# KITÊBA PÎROZ

# KITÊBA PÎROZ

BI KURDÎ (Zaravayê Kurmancî)
Kurdish (Kurmanji Dialect)
Kurdisch (Kurmandschi Dialekt)
Kürtçe (Kurmanci Lehçesi)

Çeviri ile ilgili görüşlerinizi bize yazabilirsiniz:
Hûn dikarin di derheqê wergerê de fikr û ramanên xwe ji me re binivîsin:

© Hoffnung und Leben e.V.
Komela Hêvî û Jiyanê
Umut ve Yaşam Derneği
Postfach 10 13 82 · 33513 Bielefeld · Germany
E-Mail: Incilkurd@web.de · www.Hoffnung-Leben.info

CLV · Christliche Literatur-Verbreitung e.V.
Postfach 11 01 35 · 33661 Bielefeld · Germany
www. clv.de

Çap/Druck/Baskı: Mijdar/November/Kasım 2011

ISBN: 978-3-00-022821-6 (Hoffnung und Leben e.V.)
ISBN: 978-3-89397-005-6 (CLV)

# KITÊBA PÎROZ

## PEYMANA KEVIN Û PEYMANA NÛ

# NAVEROK

## PEYMANA KEVIN

Pêşgotin. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 9
Pêşgotina bona çapa duwemîn . . . . . . . . . . . . . . . . . 13
Pêşgotina bona çapa sêwemîn . . . . . . . . . . . . . . . . . 15
1. Mûsa (Afirandin) . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 19
2. Mûsa (Derketin) . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 103
3. Mûsa (Lêwiyiyan) . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 172
4. Mûsa (Hejmaran) . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 223
5. Mûsa (Ji nû ve lêkirin) . . . . . . . . . . . . . . . . . . 292
Yêşû . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 353
Serweran . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 394
Rût. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 433
1. Samûyêl . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 440
2. Samûyêl . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 491
1. Qiralan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 534
2. Qiralan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 586
1. Dîrokan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 634
2. Dîrokan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 679
Esra . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 735
Nehemya. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 751
Ester . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 774
Eyûb . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 787

Zebûr (Mezmûran) . . . . . 835
Methelokên Silêman . . . . . 953
Waiz . . . . . 994
Helbesta Helbestan . . . . . 1007
Îşaya . . . . . 1015
Yêremya . . . . . 1097
Lawijên Yêremya . . . . . 1188
Hêzekîêl . . . . . 1197
Danîêl . . . . . 1280
Hoşeya . . . . . 1306
Yowêl . . . . . 1320
Amos . . . . . 1326
Obadya . . . . . 1336
Yûnis . . . . . 1338
Mîka . . . . . 1342
Nahûm . . . . . 1350
Habaqûq . . . . . 1354
Tsêfanya . . . . . 1359
Hagay . . . . . 1364
Zekerya . . . . . 1367
Maleyaxî . . . . . 1382

**PEYMANA NÛ (Încîl)**


Meta . . . . . 1389

Marqos . . . . . 1448

Lûqa . . . . . 1484

Yûhena . . . . . 1547

Karên Şagirtan . . . . . 1592

Nameya Pawlos ji Romiyan re . . . . . 1652

Nameya Pawlos ya yekemîn ji Korîntiyan re . . . . . 1679

Nameya Pawlos ya duwemîn ji Korîntiyan re . . . . . 1705

Nameya Pawlos ji Galatiyan re . . . . . 1722

Nameya Pawlos ji Efesiyan re . . . . . 1731

Nameya Pawlos ji Fîlîpiyan re . . . . . 1740

Nameya Pawlos ji Kolosiyan re . . . . . 1747

Nameya Pawlos ya yekemîn ji Selanîkiyan re . . . . . 1754

Nameya Pawlos ya duwemîn ji Selanîkiyan re . . . . . 1760

Nameya Pawlos ya yekemîn ji Tîmotêyos re . . . . . 1764

Nameya Pawlos ya duwemîn ji Tîmotêyos re . . . . . 1772

Nameya Pawlos ji Tîtûs re . . . . . 1778

Nameya Pawlos ji Fîlêmon re . . . . . 1782

Nameya ji Îbraniyan re . . . . . 1784

Nameya Aqûb . . . . . 1804

Nameya Pêtrûs ya yekemîn . . . . . 1811

Nameya Pêtrûs ya duwemîn . . . . . 1819

Nameya Yûhena ya yekemîn . . . . . 1824

Nameya Yûhena ya duwemîn .......................... 1831
Nameya Yûhena ya sêwemîn.......................... 1833
Nameya Cihûda .................................. 1835
Peyxama Yûhena ................................. 1838
Rasteka menan .................................. 1869
Ferhengok....................................... 1875
Ka kengî dê serî li ku bête dayîn ..................... 1887

# PÊŞGOTIN

Kitêba Pîroz du beş e: Peymana Kevin û Peymana Nû. Xwedê bi navdîtiya peymanan têkiliyê bi mirovan re daniye. Peyman, ne lihevhatina her du aliyî ye; lê belê raste rast ji qencî û têkiliya Xwedê ve çê dibin. Ev peymana ku ji hezkirina Xwedê ya ji mirovan e, gerdûnî ye. Mirov ne dikare tiştekî li wê zêde bike, ne jî ji wê kêm bike. Nêzîkayî bi alîyekî ye û ji Xwedê ve ye. Hemû dem û dewranan û bêdawîbûnê jî dexlî xwe dike.
Xwedê bi navdîtiya Mûsa, daxuyaniya Peymana Kevin ji lawên Îsraêlê re kiriye û bi vê rêyê têkiliyê bi wan re daniye. Peymana Kevin, Kitêba Pîroz ya Cihûyan e; bi zimanên Îbranîtî û Aramîtî ve hatiye nivîsîn. Bi tûmî sîh û neh (39) pirtûk in. Van pirtûkan li gor nivîs û babetên xwe bi sê beşî ve cuda dibin:

1. Pirtûkên (Kitêbên) Zagonê (wekî her 5 pirtûkên Mûsa jî tête zanîn),
2. Peyxamberiyan û pirtûkên dîrokî,
3. Zebûr (Mezmûran) nivîsên sererast û yên helbestî.

Peymana Nû, ji bîst û heft pirtûkî ava bûye û bi Grêkî hatiye nivîsandin. Wekî me li jor gotin: Peymana Kevin, Kitêba Pîroz ya Cihûyan e; lê Peymana Nû, tenê ne bona lawên Îsraêlê, bona hemû mirovahiyê ye. Xwedê, soza ku di Peymana Kevin de dabû bapîran, bi Peymana Nû ve temam kiriye.
Bi peyxamdana Xwedê, peyxamberan, nêzîkî hezar salan Peymana Kevin nivîsandine. Dîsa bi peyxamdana Xwedê, nivîskaran, nivîsandina Peymana Nû, ji du sed (200) salî kêmtir qedandine. Navê Peymana Nû, ya di nava gel de bi navê 'ÎNCÎL' ê ve tê nasîn, bi rastî EVANGELIYON e û mana wê NÛÇEYA KÊFXWEŞIYÊ ye.
Peymana Nû ji bîst û heft (27) nivîsên cihê pêk tê. Vana di derheqê 4 babetên bingehîn de ne û yekitiyekê pêk tînin:

1. Jiyana Îsa ji aliyê çar nivîskarên ku, navên wan Meta, Marqos, Lûqa û Yûhena ye ve hatiye nivîsandin. Van nivîskaran him raste rast bûn şahdeyê bûyeran û him jî ji şahdeyan guhdarî kirin. Qasî 150 sal paşî Îsa van nivîsana bi yekitiyê ve hatin weşandin.

2. Karên Şagirtan mîna nivîsên pêşiyê, di derheqê babetên dîrokî de ne. Vê beşa ku Lûqa nivîsandiye, bi şandina Ruhê Pîroz ji aliyê Îsa Mesîh ê bi ezmanan de hatiye hilkişandin ve dest pê dike. Qala avabûna Civaka bawerkiran (Dêrê) û bûyerên bûne dike.
3. Bîst û yek (21) Nameyên ku nûçevanan nivîsandine jî qala kesitiya Îsa Mesîh paşî vejîna wî û hînkariya di derheqê vêya de dike. Nûçevan Pawlos, ji vana 13 heban ji kes û civakên cihên wan eşkere ne re nivîsandiye. 8 Nameyên din jî ji civakên belavbûyî ne re hatine nivîsandin. Babeta bingehîn ya her nameyê di derheqê pirsgirêkên rojane de ye.
4. Babeta bingehîn a nivîsa PEYXAM GIRTINÊ dawiya deman (Esktologya) e.

Qala belavokên peyxamberî yên di derheqê dîsa hatina Îsa Mesîh de ne dike.
Ev 27 nivîsan, pêşiyê bi zimanê Yewnanî ya kevin ve hatin nivîsandin. Di nava sedsala duwemîn de, ji aliyê civakan ve hate xwendin û bi kar anîn. Nêzîkî sedsala duwemîn de dest bi wergerîna zimanên din kirin. Bi vî avayî, civakên din jî bi zimanê xwe ve dest bi xwendinê kirin. Bawerkirên Mesîh; mîna Peymana Nû; bi Peymana Kevin jî baweriya xwe tînin û wê qebûl dikin...

## DI WERGERÊ DE RÊ Û METOD

Me wergerê tenê bi peyxam û quweta ku Xudan Îsa Mesîh daye me, anîn serî. Ne alîkarên pispor û zane, ne jî kapîtalek mezin li cem me hebûn. Lê em bawer in ku her çiqas kêmasî tê de bibin jî, ew bi pirranî ji ber dûrbûyîna wergervanan e. Ji ber ku him ji aliyê teknîkî, him jî ji kêmasiya wextê şuxl, xebat, axaftin û mijûl bûnê îmkan nîne ku kêmasî tê de tunebin. Ev gilî û gazincên me ji rewşa me ye. Lê di wergerê de kitêba me yî bingehîn pirtûka reformîstê herî mezin Martîn Lûther û nîşe û nivîsên wî bûn. Dîsa jî ji aliyên hin zimanzanan li gor Îbranîtî û Grêkî jî werger hatiye kontrol kirin. Û wekheviya wê û ya rast ji aliyê zimanzanan ve hatiye tesdîq kirin.
Me navên mirov û cihan, heta ku ji me hat, li gora xwendin û nivîsandina Kurmanciyê wergerandin. Navên gellek cihan, ji ber ku îroj hatine guhertin, mîna nivîsên Îbranîtî û Grêkî hatin wergerandin. Di

wergerê de bi du şiklî Xudan derbas dibe. Yek mîna Xudan tête nivîsandin, ew bi Îbranîtî; "Adonay" e (bi gotina "Rebbî" jî têtê gotin û di mahna mamoste, fêrmend, hosta de ye). Yê din jî mîna XUDAN (bitûmî bi tîpên mezin) hate nivîsandin. Ew jî bi Îbranîtî "ELOHÎM", "YHVH", "YAHVE", "YEHOVA" ye û di mahna XUDANÊ Serwer de ye.

Ravekirina ku me di hundirê kevaneyê ( ) de kirine, an mahna duwemîn ya wê ayetê, an jî ravekirina wê ye. Bona ku ew ayet hîn jî qenctir bête fêhm kirin, wergervanan bi ser ve kirine.

Şerîet: Di vê wergerê de, di gellek cîhan de me gotina şerîetê, ji ber ku gellek caran di nav gel de bi vî awayî derbas dibe, mîna "zagon" nivîsandin û di tûmahiya kitêbê de wusa wergerandin.

Me wezin û pîvanan jî bi rastekekê li paşî pirtûkê wergerandin menayên îrojê. Em hêvîdar in ku dê ev Kitêba ku berî hezar salan hatiye nivîsandin, çawa ku di dewr û deman de bi coşî hatiye xwendin îroj ji aliyê gelê me jî bi wê kêfxweşî, dilşayî û coşînê ve bête xwendin.

## DI ZIMANÊ KURMANCÎ DE KITÊBA PÎROZ

Mizgîniya Îsa Mesîh (Peymana Nû), cara pêşîn di sala 1872'an de bi Kurdî hatiye weşandin. Ew werger bi tîpên Ermenî hatibû weşandin. Wekî din beş bi beş Mizgînî hatiye wergerandin û weşandin. Ew bi xwe, di sala 1992'an de, beşa Lûqa, ji aliyê Weşanxana Doz ê (İstanbul) ve bi tîpên Latînî û Erebî (çapa vê wergera ya yekem ji aliyê Enstîtuya Kurd ya Bonn ve hatiye weşandin), cara duwemîn dîsa beşa Lûqa, bi navê "Mizgînî- Mizgîniya Îsa Mesîh Li Gora Lûqa", bi tîpên Latînî ji aliyê Weşanxana Kitêba Pîroz (Kitabı Mukaddes Yayınevi-İstanbul) ve, cara sêwemîn ji aliyê Enstîtuya Tercumaniya Kitêba Pîroz ve di sala 1993'an de, bi tîpên Kîril û Latînî, beşa Meta, bi navê "Mizgîniya Îsa Mesîh Li Gora Mete", bi devok a Kurmancî ya Behdînanî ve li Swêdê hatiye weşandin. Cara çaremîn beşa Yûhena, di sala 1994'an de, ji aliyê Weşanxana GBV' ve, bi navê "Mizgîniya Îsa Mesîh Li Gora Yûhenna (ÎNCÎL)", bi wergera Resûlê Qereqoçanî, li Germenîstanê, hatiye weşandin. Cara pêncemîn, dîsa beşa Yûhena, di sala 1997'an de, ji aliyê Weşanxana Kitêba Pîroz (Kitabı Mukaddes Yayınevi- İstanbul) ve bi tîpên Latînî û bi navê "Yûhena Încîl" ve hatiye weşandin.

Lê divê em bi girîngî bidin daxuyanî kirin ku Peymana Kevin tu carî bi zimanê Kurdî nehatiye wergerandin, weşandin û çap kirin.
Ev wergera ku niha di destê we de ye, di dîroka dinê de, cara yekemîn bitûmî bi zimanê Kurdî (Kurmancî) ve tête wergerandin. Hemûya Kitêba Pîroz, cara yekemîn e ku, bi zimanê Kurdî tête weşandin.
Ev wergera, ji aliyê Said Alpaslan (Seîdê Dewrêş) û Resul Yıldırım (Resûlê Qereqoçanî) ve hatiye wergerandin.
Said Alpaslan (Seîdê Dewrêş) di sala 1972'an de li Şemrexa Çiyayê Mazî hatiye dinê. Ji gundê Bîrika Hesen e û bi xwe ji eşîra Hesenan e. Ew ji salên 1990'an de dest bi şuxlên xwe yî di derheqê zimanê Kurdî de kiriye. Heta sala 1995'an de di gellek rojname û kovaran de, helbest û nivîsên bi zimanê Kurdî nivîsandiye. Ji Peymana Kevin ve Methelokên Silêman wergerandiye û ev werger ji aliyê rojnameke hefteyî ve hatiye weşandin. Hîn sê pirtûkên wî yî hatine weşandin hene. Seîd bi xwe li Amedê dijî.
Resul Yıldırım (Resûlê Qereqoçanî); di sala 1959'an de li Mîrehmedan a Qereqoçanê hatiye dinê û ji xwe, ji Qereqoçan a Elezîzê, ji gundê Mîrehmedê ye. Ji 1986'an de dest bi şuxulên xwe yî zimanê Kurdî kiriye. Resûl bi xwe berê mele bû. Lê ji ber ku Xudan Îsa Mesîh xêr û xweşiya xwe danî ser wî, ji sala 1987'an de baweriyê bi Mesîh Îsa re aniye û di rêya belavkirina Mizgîniyê de dixebite. Resûl niha li Germenîstanê dijî. Xeynî vê wergerê, gellek şuxulên wî yî di derheqê Mizgînî û Îsa Mesîh de hene. Ev bi kurtî, Zêr a Rasteqîn, Xudan Nas Bike, Kilamên Mesîhî (Qesîdeyên Mesîhî. Vana qesîde ne û 3 heb qaset in) hwd. Xeynî vana di nav gelên me yî histuxwar û reben yên ku ji ber zilm û zorê reviyane Ewropayê de dixebite û ji aliyê hiqûq û wekî din alîkariyek mezin bi wan re dike.
Heta niha Mizgîniya Xwedê bi nêzîkî hezar zimanî hatiye wergerandin. Gellek ji wan gelên ku bi van zimanan diaxifin, hejmara wan, ji ya gelê Kurd ve gellekî kêmtir e.
Her du wergervan, li ser vê şuxula dibêjin:
***"Me xwestin ku mîna neteweyên dinê, bila gelê me jî bigihêje zanîna Xwedê û Xudan Îsa Mesîh. Em bawer in ku bi saya Zanîna Xwedê û Xudan Îsa Mesîh, gelê me bigihêje azadî û aşitiya rasteqîn. Em jî ji bo vê yekê bi navê Xelaskerê rast Îsa Mesîh dua dikin."***

Bila Xudan bi gelê me yî histuxwar re be! Amîn.

# PÊŞGOTINA BONA ÇAPA DUWEMÎN

Ji destpêka wergerê, heta sala 2007'an, wergervan Resûlê QEREQOÇANÎ û Seîdê DEWRÊŞ, li ser werger û serrastkirinê xebatê xwe domandin.
Ev wergera ku niha di destê we de ye, di dîroka dinê de, cara yekemîn bitûmî bi zimanê Kurdî (Kurmancî) ve di sala 2004'an de hate wergerandin.

Dema werger didomiya, wergervan, bo ku zû bi zû bigihêje gel, beş bi beş Kelamê weşandin. Beşa Peymana Nû di sala 1998'an de, beşa Zebûrê jî di sala 1999'an de, beşa Rût jî di 2001'ê de, ji nav weşanên Weşanxana GBV (Gute Botschaft Verlag - Germenistan) de hatin çapkirin û ji aliyê gelê me ve balkêşiyek mezin dît.

Wergera hemûya Kitêba Pîroz, cara yekemîn di sala 2004'an de çû serî, qediya û ji aliyê Weşanxana GBV (Gute Botschaft Verlag - Germenistan), bi zimanê Kurdî hate weşandin. Werger ji aliyê Gelê me û sazî û rêxistinên gelê me ve leqe û balkêşiyek girîng dît. Di demek kurt de, ji Libnan heta Swêdê, ji aliyê gellek kesî û saziyan ve, bi rêya peyam, e-peyam û telefon û faksan ve hate xwestin, xwendin, lêkolîn kirin û rexnandin. Li ser vê eleqedariyê, beşa Peymana Nû di sala 2006'an de, ji nav weşanên Weşanxana Pirtûkên Ber ve Rasteqîniyê (Gerçeğe Doğru Kitapları), li Îstanbûlê hate weşandin. Vê çapê jî balkêşiyek mezin dît.

Bila baş bête zanîn ku ev xebat; li ser alîkariya Xwedê û dilnizmiya bawermendan ve dimeşe. Tu hêz, partî, sazî, dewlet û organîzasyon ne li pişta vê xebatê ye. Yanê çavkanî û alîkirê vê xebatê Xudan û Xelaskerê me Îsa Mesîh e. Şikirî ji wî re be; ji ber ku ew liyaq e.
Îsa Mesîh wusa got:
**Hemû rayedariya ezman û erdê ji min re hate dayîn. Niha hûn herin, hemû neteweyan bikin şagirt û wan bi navê Bav û Law û Ruhê Pîroz ve vaftîz bikin; bi girtina hemû tiştên ku min ji we re emir kirine hînî wan bikin. Û a vay, ez hemûya rojan, heta dawiya dinê bi we re me!** (Încîl; Meta 28 18 – 20)

Belê çapa yekemîn li Germenîstanê bû. Me xwest ku çapa duwem ya Kitêba Pîroz li cem gelê me; li ser axa Mizgîniyê be. Ger ev xebat bala gelê me bikişîne, em ê zanibin ku ked û xwêdana me cîhê xwe dîtiye û gelê me yî histuxwar jî bi saya Kelama Xwedê; aştiya rasteqîn, xelasiya rasteqîn binase û bighêje jiyana abadîn ya ku di Xudan Îsa Mesîh de yî.

Bila Xelaskerê me Îsa Mesîh û Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûp; aştî, hezkirin û xelasiya rasteqîn bike para gelê me jî...! Amîn

# PÊŞGOTINA BONA ÇAPA SÊWEMÎN

Wergera Kitêba Pîroz bona me wergervanan, mîna xewnekê dûr û bêderfet bû. Ji ber, her çi qas em li Mezrabotan û di nava çanda pirrolî de jiyîbin, dîsa jî çanda Mesîhî dûrî me bû, zimanê meyî zikmakî qedexe bû, tip û elfabe gellekî bi derengî me naskirîbûn û qasî ku me ji devê dayikên xwe bihîstibûn em pê ve hîn bûbûn.

Gellek astengiyên me, kêmasiyên me û tirsên me hebûn. Tirsa me ya herî mezin, dijwariya bi zimanekî zelal û bi awayekî rast wergerandin bû. Pirsgirêka me ya mezin ji aliyê aboriyê bû. Ji ber, wekî ku me di her du çapên din de jî gotin ne sazî, ne partî, ne organîzasyon û ne jî dewletekê piştgiriyê da xebata me. Tenê bi alîkariya Xwedanê Dilovan û dilnizmiya bawermendan ev xebat bi salan e didome û digihêje gelê meyî histuxwar.

Îroj em li derbasiya xebatên xwe dinêrin û spasî û pesnahiyê ji Mesîh Îsa re dikin. Ji ber ku di nava hemî bêderfetiyan de xebata me ya wergerê gihaşt asta herî bilind. Me qasî pirtûkxaneyekê dagire pirtûk û rîsaletan wergerandin. Ji Peymana Nû heta Zebûr, Rût, Qesîdeyên Xwedanî û Kitêba Pîroz, bi dehan pirtûk ducar ducar hatin weşandin. Li çar aliyê dinê vê xebata me deng da, gihaşt destê gelê me, ji Îran ta Swêdê, ji Fransê ta Kanada balkişand û hate xwestin û xwendin.

Çapa yekemîn, di sala 2004'an de, li Germenîstanê, ji aliyê Weşanxana GBV (Gute Botschaft Verlag), Çapa duwemîn di sala 2007'an de, li Tirkiyê, ji aliyê Weşanxana Pirtûkên Ber ve Rasteqîniyê (Gerçeğe Doğru Kitapları Yayınevi) ve bi deh hezaran hatin çapkirin. Ji roja ku me dest bi xebata wergerê kirine, heta îrojê her tim ji aliyê zimên, me kontrolek bê sekin li ser wergerê ve meşandin û ji ber ku ziman tiştekî zindî ye û dijî û geş dibe, me jî zimanê wergera xwe tim û tim li gora nûbûnên Zimanê Kurdî bi nûkirin û pêş ve birin.

Îroj ev çapa sewêmîn di destê we de ye. Bi rastî çapa yekemîn bona me xewek bû, lê ev çapa sêwemîn bi xwe jî nûwazeyên (mûcizetên) Xudanê meyî Zindî Îsa Mesîh, nuwazeyek bilind e. Wî bi xwe piştî

2000 salî rê da û Mizgînî û xelasiya rasteqîn bi destûra wî, di zimanê dayikên me de wergeriya axa pîroz ya Mezopotamyayê. Bila pesnahî her tim ji navê Wî re be.

Îsa Mesîh wusa got: **"Hemû rayedariya ezman û erdê ji min re hatiye dayîn. Niha hûn herin, hemû neteweyan bikin şagirt û wan bi navê Bav û Law û Ruhê Pîroz ve vaftîz bikin û bi girtina hemû tiştên ku min ji we re emir kirine hînî wan bikin. Û a vay, ez hemûya rojan, heta dawiya dinê bi we re me!"** (Încîl; Meta 28:18-20)

Belê, di her du çapên pêşîn de bi deh hezaran pirtûk hatin çapkirin, belavkirin û xwendin. Him nûbûnên zimên him jî daxwaziya gelê me, çapa sêwemîm mîna barekî danî ser milên me û avakirina vê wezîfê da pêşiya me... Em bawer in ku bi pêşveçûna xebatê, dê aşitiya Xwedanê me, li ser axa welatê me ya bi xwîn û barûdê ve hatiye şuştin, dê bi awayekî rasteqînî bicîh bibe û qam bide.

Bila Xelaskerê me Îsa Mesîh û Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûp; aştî, hezkirin û xelasiya rasteqîn bike para gelê me jî...! Amîn.

# 1. MÛSA[1]

*Pêşgotin*

Pirtûka Afirandinê têgîhandina afirandina gerdûn û mirov, destpêka guneh û janên ku dê di dinê de bêne kişandin, têgîhandina nêzîkbûna Xwedê ya ji mirovan re dike. Em dikarin Pirtûka Afirandinê mîna du beşên bingehîn şîrove bikin:
1.Birrên 1-11, çîroka afirandina dinê û mirovên pêşîn e. Naveroka wê çîroka Adem û Hawa, Kayîn û Habîl, Nûh, tofan û çîroka qûleya Babîlê ye.
2.Birrên 12-50, çîroka bapîrên Îsraêlê yên pêşiyê ne.
Pêşiyê di derbarê Birahîmê ku bi bawerî û îtaeta xwe yî ji Xwedê re tête zanîn. Li pêy vêya çîroka Îshaqê lawê Birahîm, Aqûbê zazê wî û qala donzdeh lawên Aqûb dike. Ji nav vana çîroka Aqûb û çîroka bûyerên ku Aqûb û lawên wî hewcedar dikin ku herin û li Misirê bijîn, cîhekî taybet digire.
Di pirtûkê de her çiqas çîroka mirov hebe jî; di navenda bûyeran de Xwedê heye. Yê ku her tiştî afirandiye, yê bi guneh darazî û bi ceza kiriye, alîkarî û pêşengiyê ji gelê xwe re kiriye her tim ew e. Pirtûk bona çîroka kesê ku ji Xwedê re îtaet kirine bigire bin qeydê û bona nifşeyên ku dê werin vê baweriyê bidomînin hate nivîsandin.
Li gor baweriya kevneşopî, nivîskarê pirtûkên Afirandin, Ji Misirê Derketin, Lêwiyan, Li Çolê Jimartin û Ji Nû Ve Lêkirina Zagonê, Mûsa bi xwe ye. Ev her pênc pirtûk di Îbranîtî de bi navê: "Tora" têne zanîn. Navê Tewrat ya bi Kurdî jî ji Torayê ve tê.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:25 | Afirandina Gerdûn û Mirov |
| 3:1-24 | Destpêka gunehê û kişandina êşan |
| 4:1-5:32 | Ji Adem heta Nûh |
| 6:1-10:32 | Nûh û tofan |
| 11:1-9 | Qûleya Babîlê |
| 11:10-32 | Ji Sem heta Birahîm |
| 12:1-35:29 | Bapîrên Pêşiyê: Birahîm, Îshaq û Aqûb |

1 Destpêkirin, Afirandin.

36:1-43 Nîjada Esav
37:1-45:28 Ûsiv û birayên wî
46:1-50:26 Îsraêlî li Misirê

*Afirandina Dinê*

*Xwedê ezman û erd afirand*

Neh 9,6; Zeb 124,8; Yêr 32,17; Yû 1,1-3

1 Di destpêkê de Xwedê ezman
û erd afirand.

*Roja yekemîn*

Zeb 104,2; Yeşû 45,7; 2.Kor 4,6

2 Û erd tenha û vala bû; li ser rûyê
balûpalê tarî hebû û Ruhê Xwedê
li ser rûyê avan di tevgerê de bû.
3 Xwedê got: Bila ronahî bibe! û
ronahî bû. 4 Û Xwedê dît ku, ro-
nahî qenc e û Xwedê ronahiyê ji
tariyê ve cuda kir[1]. 5 Û Xwedê ji
ronahiyê re got: Roj û ji tariyê re
jî got: Şev. Û bû êvar û bû sibe:
roja yekemîn.

*Roja duwemîn*

Zeb 104,2; 18,2

6 Xwedê got: Bila di nava avan
de qubeyek çêbibe û avê ji avê
veqetîne! 7 Û Xwedê qube çêkir
û avên di bin qubê de ne, ji avên
ku di ser qubê de ne ve veqetand û
ûsa bû. 8 Û Xwedê ji qubê re got:
Ezman. Û bû êvar û bû sibe: roja
duwemîn.

*Roja sêwemîn*

Eyûb 38,8-11; Zeb 104,5.14-17

9 Û Xwedê got: Bila avên di bin
ezman de ne, li cîhekî bicivin û
erda ziwa bê xuyanîbûn! Û ûsa bû.
10 Û Xwedê navê erda ziwa: Girav
û navê avên civiyane jî: Behr danî.
Û Xwedê dît ku qenc e. 11 Û Xwedê
got: Bila rûyê erdê rehêleyan û li
gor celebê xwe, darên mêwê, yên
ku tova wan di mêwê wan de ne
hilberînin! Û ûsa bû. 12 Û rûyê
erdê rehêleyan û li gor celebê xwe,
darên mêwê, yên ku tova wan
di mêwê wan de ne hilberand. Û
Xwedê dît ku qenc e. 13 Û bû êvar
û bû sibe: roja sêwemîn.

*Roja çaremîn*

Zeb 104,19; 136,7-9

14 Û Xwedê got: Bila di ezman[2]
de, şewleyên qasî rojê ji şevê cuda
bike û rûyê erdê ronahî bike bibin!
15 Bila nîşanan, demsalan, rojan,
salan bidin xuya kirin. Û ûsa bû.
16 Û Xwedê, bona ronahiya ku
hîn jî mezin e ji rojê re serweriyê
bike û ya biçûkê bona ku serwe-
riyê ji şevê re bike, du ronahiyên

---

1 An jî: Veqetand.

2 An jî: Sêla ezmanî.

mezin çêkirin; stêrkan jî çêkirin.
17 Û Xwedê bona ku rûyê erdê
ronahî bikin, bibin serwerê roj û
şevê, ronahiyê ji tariyê cuda bikin,
18 wan li sêla ezmanî bi cîh kirin.
Û Xwedê dît ku qenc e. 19 Û bû
êvar û bû sibe: roja çaremîn.

*Roja pêncemîn*

Zeb 104,24-26; 148,7

20 Û Xwedê got: Bila av bi afirên
bi can ve tijî bibin û ji ser ve biçin,
li ser rûyê erdê, li ezmanan civîk
bifirin! 21 Û Xwedê cenawirên
behrê, yên mezin, hemû bicanên di
behrê de dilîzin û afirên difirin, li
gor celebên wan afirandin. Û Xwe-
dê dît ku qenc e. 22 Xwedê, bi go-
tina: Bi berdar bibin û zêde bibin,
behran dagirin, bila li rûyê erdê ci-
vîk zêde bibin! wan pîroz kir. 23 Û
bû êvar û bû sibe: roja pêncemîn.

*Roja şeşemîn*

1.Mûs 2,19-20; Zeb 148,10

24 Û Xwedê got: Bila rûyê erdê
celeb bi celebî afirên bi can, hey-
wanên hov û kedî, marîjokan[1] pêk
bîne! Û ûsa bû. 25 Û Xwedê, hey-
wanên rûyê erdê li gor celebên
wan û gayan li gor celebên wan
û her tiştên ku li erdê xirînbar in
li gor celebên wan afirandin. Û
Xwedê dît ku qenc e.
26 Û Xwedê got: Em mirov, di
sûretê xwe de, mîna xwe biafirînin.
Û: Bila ji masiyên di behrê de ne,
ji civîkên li ezman in, ji heywanên
hov, ji marîjokan, ji tûmiya rûyê
erdê re bibe serwer! 27 Û Xwedê,
mirov di sûretê xwe de afirand,
bi vî awayî ûsa çêbû ku, mirov di
sûretê Xwedê de hate afirandin.
Mirovan bi nêrî û mêyî afirand.
28 Û Xwedê wan pîroz kir û got: Bi
berdar bibin, zêde bibin, rûyê erdê
dagirin û bigirin bin dageriya xwe;
ji masiyên di behrê de ne, civîkên
li ezman in û hemû bicanên ku li
rûyê erdê dijîn re, bibin serwer!
29 Û Xwedê a vay, ez li rûyê erdê,
her gîhayê ku tovê dide û her darê
mêwê, ya ku tova wê di mêwa wê
de ye, didim we. Ev ê ji we re bibin
xwarin. 30 Ez gîhayê hêşîn bona
xwarinê, didim hemû heywanên
hov, hemû civîkên li ezmanan û
hemû marîjokan – û hemûyên ku di
wan de hilma jiyanê heye. – Û ûsa
bû. 31 Û Xwedê her tiştê ku afiran-
diye dît û a vay, zehf qenc bû. Û bû
êvar û bû sibe: roja şeşemîn.

*Roja heftemîn*

2.Mûs 20,8-11; Marq 2,27

2 Bi vî awayî erd û ezman, bi
hemû artêşên[2] xwe ve temam
bûn. 2 Û Xwedê karê ku dikir,

---

1 Marîjok: Vê gotina Îbranîtî, heywanên giravê, mîna mişk, kêzik û yên din jî digire hûndirê xwe. Mana wan yek e.

2 Afirên, ûnsûrên, an jî: Endamên.

di roja heftemîn de qedand. Û di
roja heftemîn de dev ji kar berda
û rawestiya. 3 Û Xwedê roja hef-
temîn bimbarek danî û pîroz kir.
Ji ber ku Xwedê, wê rojê hemû
karê ku dikir, diafirand qedand û
rehet kir[1].

*Adem û Hawa*

4 Metheloka afirandina erd û
ezman ev e: 5 Dema XUDAN
Xwedê, erd û ezman afirandin, li
rûyê erdê şuvek biyan, gîhayek jî
neqediya bû[2]. Û ji ber ku XUDAN
Xwedê, hîn baranê neşandibû
rûyê erdê. Mirovê ku zewiya
bajo jî tune bû. 6 Û dûhê ku ji
erdê ve bilind dibû, av dida hemû
zewiyan. 7 Û XUDAN Xwedê,
Adem ji axê ve afirand û hilma
jiyanê pifî pozê wî kir. Û bi vî
awayî, Adem bû hebûnek[3] bi can.
8 Û XUDAN Xwedê, li rojhilatê,
li Adenê bexçeyekê danî. Û
Ademê ku afirandibû jî danî wir.
9 Û li bexçê, celeb bi celeb darên
xweşik, yên ku mêwên qenc didin
mezin kir[4]. Û di nava bexçê de
dara jiyanê û dara zanîna qencî
û xerabiyê hebû. 10 Û ji Adenê
çemek derket, avê da bexçê û bi
çar milî ji hev veqetiya. 11 Navê
çemê yekemîn Pîşon e. Di sînora
Havîla, ya ku çavkaniya zêran tê
de heye de diherike. 12 Li wir zêrê
qenc, gunikê gewr û onîks hene.
13 Û navê çemê duwemîn Gîhon
e. Li dora sînorê Kûşê ve diherike.
14 Û navê çemê sêwemîn Dîcle
ye. Ji rojhilata Asûr ve diherike.
Û çemê çaremîn jî Ferat e.
15 Û XUDAN Xwedê, bona
ku li bexça Adenê binêre, tê de
buşuxule, Adem danî wir. 16 Û
XUDAN Xwedê emir da Adem û
got: Tu dikare li bexçê, mêwê heçî
darên ku tu dixwaze bixwe! 17 Lê
belê, ji darê zanîna qencî û xera-
biyê nexwe. Ji ber, roja ku tu ji wê
bixwe, bi biryarî tuyê bimirî.
18 Û XUDAN Xwedê got: Tenê
mayîna Adem ne qenc e. Ez ê
alîkirekî li gor wî be biafirînim.
19 Û XUDAN Xwedê, hemûya
heywanên li erdê û hemûya ci-
vîkên li ezmanan ji axê ve afiran-
dibû. Û bona ku bibîne, ka Adem
çi navî dide wan, hemûyan anî
cem Adem[5]. Adem her çi navî
dabe her yekî, ew afir, bi wî navî
hate bîranîn[6]. 20 Û Adem navê
hemû heywanên hov û kedî û ci-
vîkên li ezman in danî; lê bona wî,
alîkirek li gor wî[7] nehat dîtin.
21 Û XUDAN Xwedê, xewek gi-
ran anî ser Adem. Û dema Adem

1 Vêsiya, an jî: Îstirihet kir.
2 Tune bû.
3 Afirek.
4 Gîhand.
5 An jî: Ji Adem re anî.
6 An jî: Hate bang kirin.
7 Li cîh e, rewa, an jî: Munasîb.

raket, XUDAN Xwedê, hestiyek wî yê parsuyê rahişt û cîhê wî hestiyî bi goşt ve dagirt. 22 Û XUDAN Xwedê, ji hestiyê ku ji Adem ve girtibû pîrekek afirand û wê ji Adem re anî. 23 Û Adem got: A vay, ev hestiya, ji hestiyê min hatiye stendin û goştê ku ji goştê min ve hatiye stendin ev e. Dê ji wê re: Pîrek[1] bê gotin, ji ber ku ew ji zilamî[2] ve hatiye stendin. 24 Bo vê sedemê, dê zilam dayik û bavê xwe berde û bi jina xwe ve bê girêdan û ew dê bibin bedenek. 25 Û Adem jî, pîreka wî jî tazî bûn û hîn nizanîbûn ku ka fedîkarî[3] çî ye.

*Mirov li dijî Xwedê guneh dike*

Met 4,1-11; 2.Kor 11,3; 1.Tîm 2,14

3 Û di nava heywanên ku XUDAN Xwedê afirandibû de, yê herî fenek mar bû. Û mar, pirsa: Gelo Xwedê bi rastî jî gotiye: Qet mêwan ji tu darê bexçê nexwin? ji pîrekê ve pirsî. 2 Û pîrek bi gotina: Em dikarin ji mêwê darên ku li bexçê ne bixwin bersiva wî da. 3 Lê belê Xwedê got: Ji mêwa dara ku di nava bexçê de ye nexwin, dest wê nedin, ya na hûn ê bimirin. 4 Û mar ji pîrekê re got: Bi biryarî hûn namirin! 5 Ji ber, Xwedê dizane ku, dema hûn ji mêwa wî darî bixwin, dê çavên we vebin û hûn ê bi zanîna qencî û xerabiyê ve bibin mîna Xwedê. 6 Û pîrekê dît ku mêwa darê, ji çavan re xweş û ji xwarinê re li cîh û bona qezenc kirina zaniyariyê cazib e û mêwê jê kir û xwar. Û zilamê wê li cem bû, da wî jî, wî jî xwar. 7 Çavên her duyan jî vebûn û tazî bûna xwe fêhm kirin[4]. Û bo vê yekê, pelê hêjîran dirûtin û ji xwe re kirin pêşmal.

8 Û wan dengê XUDAN Xwedayê ku di hênikayiya rojê de li bexçê dimeşiya bihîstin û zilam û pîreka wî ji ber rûyê XUDAN Xwedê reviyan û di nava daran de xwe veşartin. 9 Û XUDAN Xwedê bi banga: Tu li ku derê yî? bangî Adem kir. 10 Û Adem: Dema li bexçê dengê te bihîstim, ez tirsiyam. Ji ber ku ez tazî bûm, bo vê yekê xwe veşartim got. 11 Û XUDAN Xwedê, bi gotina: Kî ji te re got ku tu tazî yî? pirsî. Ma te ji darê ku gotim mêwa wê nexwe xwar?

12 Û Adem, bi gotina: Wê pîreka ku te danîbû cem min, mêwa darê da min, min jî xwar, bersiva wî da. 13 Û XUDAN Xwedê pirsa: Ka ev kirina te çî ye? ji pîrekê ve pirsî. Pîrekê bi gotina: Mar min xapand û bo vê yekê

---

1 Pîrek: Bi Îbranîtî Îşşa.
2 Zilam: Bi Îbranîtî Îş.
3 Şermezarî.
4 Zanîn.

xwarim bersivê da. 14 Û li ser vêya, XUDAN Xwedê ji mar re: Ji ber vê kirina te, tuyê bibe herî bi lanetê[1] hemûyê heywanên hov û kedî! got. Tuyê li ser zikê xwe ve bi erdê ve xîj bibe û di hemûya jiyana xwe de axê bixwe. 15 Û ez ê neyartiyê têxim navbera te û pîrekê, navbera nîjada te û nîjada wê; ew ê êrîşî serê te bike û tuyê êrîşî pahniya wî bikî.

16 XUDAN Xwedê ji pîrekê re got: Gava tu zarok biwelidînî[2], ez ê zehf êşê bi te bidim kişandin. Tuyê bi êş kişandinê ve zarok biwelidînî û xwestina te ji zilamê te hebe[3], dê ew jî rêvebiriya te bike. 17 Û XUDAN Xwedê ji Adem re got: Ji ber ku te guh da gotina pîreka xwe û ji mêwa darê ku ji te re gotim nexwe, te xwar, ax ji ber te hate bi nalet kirin. Tuyê di hemûya jiyana xwe de bi dijwarî[4] ji wê bixwî. 18 Û dê ax, kelem û qirşan bi te de û tuyê gîhayê bejî bixwî. 19 Heta ku tu vegere axa ku tu ji wê hate afirandin, nanê xwe bi rijandina xwêdana eniya xwe tuyê bixwî. Ji ber ku tu ax î, tu ji axê ve hatiye afirandin û dîsa tuyê vegere axê!

20 Û Adem navê Hawa[5] da pîreka xwe. Ji ber ku, ew bû dayika hemûyên dijîn[6]. 21 Û XUDAN Xwedê, bona Adem û pîreka wî, ji çerm kinc çêkir û li wan kir.

22 Û XUDAN Xwedê ûsa got: A vay, Adem bi zanîna qencî û xerabiyê, bû yekî mîna ji me be. Û niha destê xwe dirêj neke û ji dara jiyanê negire û nexwe û bêdawî nejî! 23 Û bi vî awayî, XUDAN Xwedê, bona ku axa ji wê ve hatiye girtin bajo, Adem ji bexçê Adenê ve derxist. 24 Û wî qewirand; bona çavdêriyê li rêya darê jiyanê bikin, Kerûbiyan û şûrekî bi agirî bi her alî ve dizivire danî rojhilata bexça Adenê.

*Kayîn û Habîl*

Îbr 11,4; 1.Yû 3,12.15

4 Û Adem bi pîreka xwe Hawa re raket. Û Hawa ducanî ma û Kayîn[7] anî dinê. Û wê got: Bi alîkariya XUDAN, lawekî qezenc kirim[8]. 2 Û dawiyê birayê Kayîn, Habîl anî dinê. Û Habîl bû şivanê mîhan, lê Kayîn bû cotkar. 3 Û Kayîn piştî ku roj derbas bûn, ji zadên zeviyê pêşkêşiyek ji XUDAN re anî. 4 Û Habîl jî hinek ji heywanên di keriya xwe de pêşiyê zayine, bi taybetî jî rûnên wan anî. Û XUDAN Habîl û pêşkêşiya wî

1 An jî: Nalet.
2 Zarok bînî dinê.
3 Tuyê li zilamê xwe hewes bike.
4 Bizehmet.
5 Hawa û mirov, ji gotina ku bi Îbranîtî tê mana jiyanê ve hatine afirandin.
6 Mirovan.
7 Kayîn: Bi gotina Kabîl jî tê zanîn.
8 Mirovek qezenc kirim, an jî: Anîm dinê.

qebûl kir. 5 Lê Kayîn û pêşkêşiya
wî red kir. Û Kayîn zehf hêrs bû û
wecê xwe daliqand. 6 Û XUDAN
ji Kayîn re got: Tu çima bi hêrs
bû û çima te wecê xwe daliqand?
7 Ma tu ya rast bike, qey ez te qe-
bûl nakim? Lê tu ya rast neke, gu-
neh li ber derî ketiye kemînê û li
benda te ye. Lê belê tu li wê bibe
serwer.
8 Û Kayîn, ji birayê xwe Habîl
re got: (Ka em herin zeviyê[1]). Û
wusa bû ku, gava di nava zeviyê
de li cem hev bûn, Kayîn êrîşî bi-
rayê xwe kir û wî kuşt. 9 Û XU-
DAN, pirsa: Ka birayê te Habîl li
ku derê ye? ji Kayîn ve pirsî. Û
Kayîn, bi gotina: Nizanim, ma
qey ez notirvanê birayê xwe me?
bersivê da. 10 Û XUDAN got: Te
çi kir? Xwîna birayê te, ji axê ve
bangî min dike! 11 Û êdî tu di bin
naleta axa ku bona xwîna birayê
te, ya ku te rijandiye vexwe devê
xwe vekiriye de ye! 12 Dema ku
tu axê bajo, dê êdî dexlê nede te.
Tuyê li rûyê erdê revok û eware
bigerî! 13 Û Kayîn; bi gotina:
Ceza min, qasî ku ez nikaribim
hilgirêm giran e! bersivê da XU-
DAN. 14 A vay, te îro min ji rûyê
erdê ve qewirand, êdî ez ê li dûrî
hizûra te bimînim û li rûyê erdê,
bi revok û ewaretî bigerim û wusa
bibe ku, kî min bibîne, dê min bi-
kuje! 15 Û XUDAN ji wî re got:
Ger kî Kayîn bikuje, dê ji wî heft
car tol bê stendin. Û XUDAN,
bona ku kî Kayîn bibîne û nekuje,
nîşanekê danî ser wî. 16 Û Kayîn
ji hizûra XUDAN ve derket[2]. Û li
axa Nodê[3], ya ku li rojhilata bexça
Adenê ye bi cîh bû.

*Nîjada Kayîn*

17 Û Kayîn bi pîreka xwe re raket.
Û pîreka wî bi ducani ma û Henox
anî dinê. Û di wê demê de, wî
bajarekî ava kir. Û navê lawê xwe
Henox da bajêr. 18 Û ji Henox ve
Îrad bû. Û ji Îrad ve Mehûyael
û ji Mehûyael ve Metûşael bû
û ji Metûşael ve Lamex bû.
19 Û Lamex bi du pîrek re zewicî.
Navê yekê Ada û navê ya din jî
Sîla bû. 20 Û Ada, Yabal anî dinê,
Yabal bû bapîrê kesên di konan de
rûdinin û koçerên xwedî keriyan[4]
in. 21 Û navê birayê wî Yûbal bû.
Yûbal bapîrê kesên ku li bilûr û
lîrê dixin bû. 22 Û Sîla jî Tubal-
Kayîn anî dinê. Tubal-Kayîn, ji
hesin û tûncê ve celeb bi celeb
haletên jêkirinê çê dikir. Xwuşka
Tubal-Kayîn Naama bû.
23 Û Lamex ji pîrekên xwe re ûsa
got: Ya Ada û Sîla, min guhdarî
bikin! Ya pîrekên Lamex, guh

*1* Gotinên: Ka em herin zeviyê ji Septûagînta, Tewrata Samîriyê û ji nivîsên Vûlgat û Suryanîtî ve hatine stendin.

*2* Cuda bû.

*3* Nod: Teral, betal, eware.

*4* Pez.

bidin gotinên min! Ji ber ku min
birîndar kir û zilamekî kuşt; ji
ber ku tahdê li min kir; ciwanekî
kuştim!
24 Ger dê tola Kayîn heft cara bê
stendin, divê heftê û heft cara tola
Lamex bê stendin.
25 Û Adem dîsa bi pîreka xwe re
raket. Û wê lawekî anî dinê. Û bi
gotina: Xwedê, li dêvla Habîlê ku
ji aliyê Kayîn ve hate kuştin la-
wekî din li min bexşand navê Şît[1]
da lawê xwe. 26 Û lawekî Şît jî
bû û navê Enoş li wî kir. Wê gavê
mirov dest pê kirin û bangî navê
XUDAN kirin[2].

*Ji Adem heta Nûh*

1.Mûs 4,25-26; 1.Dîr 1,1-4; Îbr 11,5-6;
Cihû 14-15

5 Kitêba nîjada Adem ev e: Di
roja ku Xwedê mirov afirand,
wî di mînaka Xwedê[3] de çêkir.
2 Wan bi nêr û mêyî afirand û pîroz
kirin. Û dema roja ku hatin afiran-
din, navê: Mirov da wan. 3 Û dema
ku Adem sed û sîh salî bû, lawekî
wî yî di sûretê wî de û wekî wî ye
bû. Û navê Şît li wî kir. 4 Û paşî
bûyîna Şît, Adem hîn heyşt sed
salê din jiyana xwe domand. Û
wekî din keç û lawên wî çê bûn.
5 Û Adem, bi tûmî neh sed û sîh sal
jiyîna xwe domand û mir.
6 Û dema Şît sed û pênc salî bû,
lawê wî Enoş hate dinê. 7 Û paşî
bûyîna Enoş, Şît hîn heyşt sed û
heft salên din jiyiya. Û wekî din
keç û lawên wî bûn. 8 Û Şît bitûmî
neh sed û donzdeh sal jiyana xwe
domand û mir.
9 Û Enoş gava nod salî bû, lawê wî
Kenan hate dinê. 10 Û paşî bûyîna
Kenan, Enoş hîn heyşt sed û panz-
deh salê din jiyana xwe domand. Û
wekî din keç û lawên wî bûn. 11 Û
Enoş bi tûmî neh sed û pênc sal ji-
yana xwe domand û mir.
12 Û Kenan gava heftê salî bû,
lawê wî Mahalalel hate dinê. 13 Û
paşî bûyîna Mahalalel, Kenan hîn
heyşt sed û çel salê din jiyana xwe
domand. Û wekî din keç û lawên
wî bûn. 14 Û Kenan bi tûmî neh
sed û deh sal jiyana xwe domand
û mir.
15 Û Mahalalel, gava şêst û pênc
salî bû, lawê wî Yared hate dinê.
16 Û paşî bûyîna Yared, Mahalal-
el heyşt sed û sîh salê din jiyana
xwe domand. Û wekî din keç û
lawên wî bûn. 17 Û Mahalalel bi
tûmî, heyşt sed û nod û pênc sal
jiyana xwe domand û mir.
18 Û gava Yared sed û şêst û du
salî bû, lawê wî Henox hate dinê.
19 Û paşî bûyîna Henox, Yared
heyşt sed salê din jiyana xwe do-

1 Şît: Efû kirin.
2 An jî: Li ber XUDAN geriyan.
3 Yanê mîna xwe afirand.

mand. Û wekî din keç û lawên wî
bûn. 20 Û Yared bi tûmî, neh sed
û şêst û du sal jiyana xwe domand
û mir.
21 Û gava Henox şêst û pênc salî
bû, lawê wî Metuşelah hate dinê.
22 Û paşî bûyîna Metuşelah,
Henox sê sed sal di rêya Xwedê
de meşiya. Û wekî din keç û
lawên wî bûn. 23 Û Henox bi
tûmî sê sed û şêst û pênc sal jiyana
xwe domand. 24 Û Henox di rêya
Xwedê de meşiya û dawiyê ji holê
ve winda bû, ji ber ku Xwedê wî
girtibû cem xwe.
25 Û Metuşelah gava sed û heyştê
û heft salî bû, lawê wî Lamex hate
dinê. 26 Û paşî bûyîna Lamex,
heft sed û heyştê û du salê din ji-
yana xwe domand. Û wekî din keç
û lawên wî bûn. 27 Û Metuşelah
bi tûmî neh sed û şêst û neh sal
jiyana xwe domand û mir.
28 Û gava Lamex sed û heyştê û
du salî bû, lawekî wî hate dinê.
29 Û bi gotina: Dê ji karê me, ji
ber vê axa ku XUDAN binalet ki-
riye û ji zehmeta destên me, ew
ê me teselî[1] bike û navê Nûh[2] da
lawik. 30 Û paşî bûyina Nûh, La-
mex pênc sed û nod û pênc salê
din jiyana xwe domand. Û wekî
din keç û lawên wî bûn. 31 Û La-
mex bi tûmî heft sed û heftê û heft
sal jiyana xwe domand û mir.
32 Û Nûh pênc sed sal buhurand
pê ve, bi navê Sem, Ham û Yafet
sê lawên wî hatin dinê.

*Tofan*

6 Û li rûyê erdê, mirov zêde
bûn. Û dema keçikên wan
hatin dinê. 2 Lawên Xwedê,
xweşikya keçên mirovan dîtin û
bi hemûyên ku hilbijartibûn ve
zewicîn. 3 Û XUDAN got: Dê
ruhê min, heta bêdawîbûnê bi mi-
rov re nekişkişîne, ji ber ku ew bi
mirinî ye. Dê temena mirov bibe
sed û bîst sal.
4 Dema di rojên lawên Xwedê, bi
keçên mirov re dizewicîn û dibûn
xwedî zarok û paşî wê de, li rûyê
erdê Nefîl hebûn. Vana lehengên
dema kevnare, kesên bi nav û
deng bûn.
5 Û XUDAN nihêrt li rûyê erdê,
xerabiya ku mirov dike pirr e, eql
û ramana wî tim û tim li ser xera-
biyê ye. 6 Û XUDAN bi afirandina
mirovan ve poşman bû. Jan da dilê
wî. 7 Û XUDAN got: Ez ê mirovên
ku min wan afirandiye, heywanan,
marîjokan, civîkan ji rûyê erdê ve
paqij bikim bavêjim. Ji ber ku ez ji
afirandina wan ve poşman bûme.
8 Lê belê Nûh, di çavê XUDAN
de dilovaniyê dît.
9 Û nifşeyên Nûh ev in: Nûh
mirovek rast bû. Û di nava hem-

1 Xemrevîn.

2 Nûh: Aramî.

demên xwe de, kesek bê qisûr bû.
Di rêya Xwedê de dimeşiya. 10 Û
sê lawên Nûh hebûn: Sem, Ham
û Yafet.
11 Û di çavê Xwedê de rûyê erdê
xera bûbû û bi zordestiyê ve tijî
bûbû. 12 Û Xwedê li rûyê erdê
nihêrt û dît ku her tişt çiqas xera
bûyîne. Ji ber ku li rûyê erdê hemû
mirov, ji rê ve derketibûn.
13 Û Xwedê ji Nûh re got: Ez ê
dawiyê bidim mirovahiyê; ji ber
ku bi wan re, zordestiyê li ser
rûyê erdê tijî bû. Û a vay, ez ê bi
wan re, rûyê erdê jî tune bikim.
14 Ji xwe re, ji darê goferê ve
keştiyekê çêbike. Qetranê li hun-
dirê wê û dervê wê bixe. Di hun-
dirê wê de odekan çêbike. 15 Û
tuyê keştiyê ûsa çêbike: Dê dirêji-
ya wê sê sed[1]; firehiya wê pêncî[2]
gez û bilindahiya wê sîh gez[3] bin.
16 Şivakeyek ronahiyê jî çêke,
bila qama wê, ber bi jor ve nêzîkî
gezekê[4] be. Û derî deyne aliyekî
keştiyê. Hêwanên jêr, nav û jorê
çêbike. 17 Û ez ê tofanê bişînim
rûyê erdê. Ez ê hemû bi canên, ku
di bin ezman de hilmê digire tune
bikim. Dê heçî tiştên li rûyê erdê
ne bimirin.
18 Lê belê ez ê peymana xwe yî
bi te re bidomînim. Bi law, jin
û bûkên xwe ve li keştiyê siwar
bibe. 19 Û bona ku bi te re sax
bimînin, ji hemû bedenê ku dijîn,
her heywanî, bi nêr û mêyî bigire
keştiyê. 20 Celeb bi celeb civîk,
heywan û marîjok, bona ku sax
bimînin cot bi cot werin cem te.
21 Û tu ji her xwarina ku tê xwa-
rin, bi xwe re bigire û li cem xwe
bicivîne û dê him bona te û him jî
bona wan bibe xwarin[5].
22 Û Nûh li gor hemû tiştê ku
Xwedê jê re emir kiribû, ûsa kir.

*Nûh li keştiyê siwar dibe*

Met 24,37-39; 2.Pêt 3,5-6

7 Û XUDAN ji Nûh re got:
Bi hemû malbata xwe ve li
keştiyê siwar bibe! Ji ber ku min,
tenê te di nav vê nifşê de rast dît.
2 Bona ku li hemûya rûyê erdê
nifşeya wan neqede, ji heywanên
ku paqij tên hesêb, bi nêr û mêyî
ji her yekê heft cotî, ji heywanên
ku gemarî tên hesêb cotek, 3 ji ci-
vîkên ezmanan jî, ji her yekî heft
cotî bigire. 4 Ji ber ku ez ê paşî
heft rojî çel roj û çel şevî baranê
bibarînim. Ez ê her bi canê ku
afirandime, ji rûyê erdê ve paqij
bikim û bavêjim. 5 Û Nûh li gor
hemû emirên XUDAN kir.
6 Û dema li rûyê erdê tofan qeti-
ya, Nûh şeş sed salî bû. 7 Û Nûh
û lawên wî, pîreka wî û bûkên wî,

1 Sê sed gez: Nêzîkî 140 Metre.
2 Pêncî gez: Nêzîkî 23 metre.
3 Sîh gez, yanê arşin: Nêzîkî 13.5 Metre.
4 Gezek: Nêzîkî 50 santîmetre.
5 An jî: Bona ku tu û wan bixwin, depo bike.

bona ku ji tofanê ve xelas bibin,
pev re li keştiyê siwar bûn. 8 Mîna
ku Xwedê emir dabû Nûh, ji her
celeb heywan, marîjok û civîkên
ku paqij û gemarî tên hisêb, 9 bi
nêr û mêyî, cot bi cot hatin cem
Nûh û li keştiyê siwar bûn. 10 Û
paşî heft rojî avên tofanê li ser
erdê ve hatin xwarê.
11 Gava Nûh şeş sed salî bû,
hivdehê meha dudan ya wê salê
hemû çavkaniyên balûpalan piji-
qîn û qapaxên ezman vebûn. 12 Û
çel roj û çel şev baran li rûyê erdê
ve bariya. 13 Nûh, lawên wî Sem,
Ham û Yafet, jina Nûh û sê bûkên
wî tam wê rojê li keştiyê siwar
bûn. 14 Bi wan re, bi her celebî
heywan û bi her celebî heywanên
kedî, marîjokan, civîkan û afirên
ku difirin, li keştiyê siwar bûn.
15 Û hemû bi canên ku hilmê di-
girin cot bi cot hatin cem Nûh û li
keştiyê siwar bûn. 16 Û heywanên
ku diketin keştiyê, mîna ku Xwe-
dê emir dabû Nûh ji hemûyên
xwedî beden in, nêr û mê bûn. Û
XUDAN, paşî Nûh derî girt.
17 Û li ser erdê tofan çel rojî do-
miya û avên ku zêde bûn, keştiyê
ji erdê ve rakirin jor. 18 Û av bi-
lind bûn, heta ku bibêje zêde bûn
û keştî bi ser avê ve ket û tevgeri-
ya. 19 Û av li ser erdê ewqas bi-
lind bûn ku, hemû çiyayên mezin,
yên ku li rûyê erdê ne, di bin avê
de man. 20 Avên ku bilind bûn,
panzdeh gezî[1] bi ser çiyayan ve
ketin.
21 Û hemû afirên ku li rûyê erdê
dijîn, tune bûn; civîkan, hey-
wanên hov û yên kedî, marîjokan
û hemûyê mirovan, 22 hemûyên
li reşayiyê bûn, yên ku di pozê
wan de hilma jiyanê hebûn mirin.
23 Û XUDAN ji mirovan, heta
heywanên kedî, ji marîjokan heta
civîkan hemû heywanan tune kir;
her tiştên li rûyê erdê paqij bûn
û çûn. Û tenê Nûh û yên ku di
keştiyê de ne man. 24 Û av, sed û
pêncî roj rûyê erdê dagirtin.

*Dawiya Tofanê*

2.Pêt 2,5

8 Û Xwedê, Nûh û yên ku di
keştiyê de ne di bîra xwe de
anî. Bayekê da rûyê erdê, av dest
bi kêm kirinê kirin. 2 Û çavkani-
yên balûpalan û qapaxên ezmanan
hatin girtin. Û ji ezmanan ve ba-
ran sekinî. 3 Û av ji rûyê erdê ve
vekişiyan. Û paşî sed û pêncî roj
derbas bû, av kêm bûn. 4 Û keştî
roja hivdeh ya meha heftemîn li
çiyayên Araratê ve rûnişt. 5 Û av,
heta meha dehemîn tim û tim kêm
bûn. Di roja yekemîn ya meha de-
han de şaxên çiyayan xuya bûn.
6 Û paşî çel rojî, Nûh paca keştiya
ku çê kiribû vekir. 7 Û qelareşkê
şand derve. Û qelareşk, heta ku av

1 Panzdeh gez: Nêzîkî 6.9 Metre.

ziwa bûn, venegeriya, ma û firi-
ya. 8 Û li ser vêya, Nûh, bona ku
fêhm bike ka av vekişiyane an jî
venekişiyane, kevokê ji cem xwe
şand. 9 Lê belê kevok, cîhekî lê
dakeve nedît, ji ber ku her der bi
avê ve tijî bû. Vegeriya keştiyê,
cem Nûh. Û Nûh destê xwe dirêj
kir, kevokê girt û girt cem xwe,
keştiyê. 10 Û heft rojê din sekinî
û dîsa kevokê ji keştiyê ve berda
derve. 11 Û kevok, di nava nu-
qilkê xwe de pelekî zeytûnê ya ku
nû hatiye jêkirin, êvarê vegeriya.
Û wê gavê Nûh fêhm kir ku av ji
rûyê erdê ve vekişiyane. 12 Û paşî
heft rojê din sekinî û dîsa kevokê
şand. Û vê gavê kevok êdî vene-
geriya.
13 Û Nûh, gava şeş sed û yek
salî bû, di roja yekemîn ya meha
yekan de, avên li rûyê erdê ne
ziwa bû. Û gava Nûh qapaxa li
ser keştiyê rakir, dît ku, a vay, ax
ziwa bûye. 14 Û di roja hivdeh ya
meha duwemîn de ax bitûmî ziwa
bûbû.
15 Û Xwedê ji Nûh re got: 16 Bi
jina xwe û lawên xwe û bûkên
xwe re, ji keştiyê ve derkeve!
17 Bi xwe re hemû bi canan,
tiştên ku dijîn civîkan, heywanan
û marîjokan jî derxîne. Bila biafi-
rin, bi berdar bibin û li rûyê erdê
zêde bibin.
18 Û Nûh, tevî jin, law û bûkên xwe
ji keştiyê ve derket. 19 Hemûya
heywanan, marîjokan, civîkan, her
celebê ji hemû afirên ku li rûyê erdê
ve dijîn, ji keştiyê ve derketin.
20 Û Nûh pêşkeşgehek ji XU-
DAN re çêkir û li wir, ji hemû
heywan û civîkên ku paqij tên
hesibandin, qewlên şewitandinê
pêşkêş kir. 21 Û XUDAN bêhna
xweş bêhn kir û XUDAN di dilê
xwe de got: Ez ê carekî din, bona
mirovan rûyê erdê bi nalet nekim.
Ji ber, meyilên ku di dilê mirovan
de ne, ji zarokantiyê ve xerab in û
mîna ku niha kirim, êdî ez tu carî
canan ûsa tune nakim.
22 Heta ku dinya bisekine, dê tim
çandin û çinandin, sar û germ, ha-
vîn û zivistan, şev û roj hebin.

*Xwedê bi Nûh re Peymanê datîne*

9 Û Xwedê Nûh û lawên wî
pîroz kir û got: Bi berdar bi-
bin, zêde bibin û rûyê erdê dagi-
rin! 2 Dê hemû heywanên li erdê
û hemû civîkên li ezman in, ji we
bitirsin û veciniqin. Hemûya bi-
canên rûyê erdê, hemû masiyên
di behrê de ne, ji destê we re hati-
ne dayîn! 3 Dê hemûyên bi can, ji
we re bibin xwarin. Mîna gîhayên
hêşîn, ez hemûyan didim we.
4 Lê belê: Divê hûn, goştê bi xwîn
nexwin, ji ber ku di xwînê de can
heye! 5 Û bi rastî xwîna we, ez ê
bo canê we bi biryarî lê bigerim.
Ez ê ji her heywanî hisabê wê bi-
pirsim. Û ji her mirovî, ji her kesê

ku qêmîşî canê birayê xwe kiriye
mafê we bipirsim. 6 Ger kî xwîna
mirovan birijîne, dê xwîna wî jî
ji aliyê mirovan ve bê rijandin. Ji
ber ku Xwedê, mirovan di mîna-
kiya xwe de afirand. 7 Û bi berdar
bin, zêde bibin. Li rûyê erdê biafi-
rin û pirr bibin.
8 Û Xwedê ji Nûh û lawên wî re
ûsa got: 9 Û a vay, ez dixwazim
ku bi we re û bi nifşeyên we yî
werin re 10 û bi hemû canên bi
we re ne, bi civîkan, heywanên
kedî û hov, bi hemûya heywanên
ku ji keştiyê ve derketine re pey-
mana xwe bidomînim. 11 Û ez ê
bi we re peymana xwe bidomî-
nim û carekî din, bi tofanê ve
hemû bi can nayên tune kirin.
Tofana ku rûyê erdê tune dike,
êdî dê çê nebe.
12 Û Xwedê bi vî awayî axaftina
xwe domand: Dê nîşana peymana
bi we re û bi hemû bi canan re, di
domahîka nifşeyan de bidome ev
be: 13 Ez ê kevana xwe li ewran
bi cîh bikim û ev ê bibe nîşana
peymana di nav min û rûyê erdê
de ye. 14 Û ez kengê ewrê bişînim
rûyê erdê, kengê kevana min di
nava ewran de xuyanî bibe, 15 ez
ê peymana ku di nav min û hemû
hebûnên bi can de ye, di bîra xwe
de bînim. Tofaneke bi canan tune
dike, êdî carekî din dê bi avê nebe.
16 Û kengê di ewran de kevan
xuyanî bibe, ez ê li wê binêrim
û peymana heta bêdawîbûnê
bidome ya ku navbera Xwedê
û bi hemû bi canên li rûyê erdê
ve dijîn di bîra xwe de bînim.
17 Û Xwedê ji Nûh re got: Nîşana
peymana ku ez ê di nava xwe û
hemû bi canên li rûyê erdê de ne
re bidomînim ev e.

*Lawên Nûh*

18 Û lawên Nûh, yên ku ji keştiyê
ve derketibûn; Sem, Ham û Yafet
bûn. Ham bavê Kenan bû. 19 Sê
lawên Nûh ev bûn. Hemû mi-
rovên li rûyê erdê ve belav bûn,
ji vana bûn[1]. 20 Û Nûh dest pê
kir ku bibe cotkar û rezek danî.
21 Û Xemrê vexwar û serxweş bû
û di hundirê çadira xwe de şût û
tazî dirêj bû. 22 Û Hamê ku bavê
Kenan e, dema tazîbûna bavê xwe
dît, derket û ji her du birayê xwe
re got. 23 Û Sem û Yafet kincekî
girtin û avêtin polên xwe, paş û
paş meşiyan û bavên xwe yî tazî
nuxumandin. Û bona ku bavê
xwe yî tazî nebînin, wecê xwe
dan aliyekî din.
24 Û gava Nûh ji xemrê hişyar bû,
kirina lawê xwe yî biçûk fêhm kir
25 û wî got: Bila nalet li Kenan
be! Bila ji birayên xwe re bibe dîlê
dîlan! 26 Û wî got: Bila pesnahî
bibe ji XUDAN Xwedayê Sem re
û bila Kenan ji Sem re bibe qûl!

---
1 Ji vana afirîn, an jî: Ji vana çêbûn.

27 Bila Xwedê firehî bide Yafet û bila di çadirên Sem de bijî û bila Kenan ji Yafet[1] re bibe qûl!
28 Û Nûh, paşî tofanê, hîn sê sed û pêncî sal jiyana xwe domand.
29 Û bitûmî neh sed û pêncî sal temena xwe borand û mir.

*Nîjada Lawên Nûh*

1.Dîr 1,4-17

10 Nifşeyên lawên Nûh Sem, Ham û Yafetê ku paşî tofanê zarokên wan bûne, ev in:
2 Lawên Yafet: Gomer û Magog, Maday û Yavan û Tuval û Meşek û Tîras. 3 Û lawên Gomer: Aşqenaz û Rifat û Togarma. 4 Û lawên Yavan: Êlîşa û Tarşîş, Kitîm û Rodanîm. 5 Bapîrên mirovên li qeraxan[2] dijîn ev in. Di welatê xwe de her yek li gor zimanên xwe, di neteweyên xwe de her yek li gor eşîrên xwe ve belav bûn.
6 Û lawên Ham: Kûş û Misrayîm û Pût û Kenan. 7 Û lawên Kuş: Seba û Hawîla û Sebta û Ragma û Sabtêka. Û lawên Ragma: Şeba û Dedan. 8 Û bi navê Nemrûd, lawekî Kûş çêbû. Bi egîdiya xwe, nav û deng da rûyê erdê. 9 Li ber XUDAN nêçîrvanek egîd bû. Gotina: Li ber XUDAN, nêçîrvanê egîd, mîna Nemrûd ji vir ve tê! 10 Û pêşiyê li axên Şînarê, li bajarên Babîl û Erek û Aqad û Kalnê qiraletiyê kir. 11 Pişt re çû Asûrê û bajarên Neynowa, Rehobot-Îr, Keleh û bajarê Resenê ya ku 12 di nava Neynowa û bajarê girîng Kelehê de ava kir; bajarê mezin ev e.
13 Û Misrayîm, bapîrê Lûdiyan û Anamiyan û Lehabiyan û Naftûhiyan 14 û Patrosiyan û Kaslûhiyan (Filistiniyan ji vana hatin) û Kaftoriyan bû.
15 Û Kenan, bavê lawên xwe yî pêşiyê Sîdon[3] û bapîrê Het 16 û Yebûsiyan û Amoriyan û Girgaşiyan 17 û Hîviyan û Arkiyan û Sîniyan 18 û Arwadiyan û Semariyan û Hamayiyan bû. Û dawiyê eşîrên Kenanî belav bûn. 19 Û sînorên Kenanê, ji Saydayê ber bi Gerer, Gaze, Sodom û Gomora û Adma û Seboyimê diçû û heta Laşayê dirêj dibû. 20 Di welatên xwe de û di neteweyên xwe de, li gor zimanê xwe û li gor eşîrên xwe lawên Ham ev in.
21 Û zarokên Sem, yê ku mezinê Yafet e jî bûn. Sem, bapîrê hemûya nîjada Eber bû. 22 Lawên Sem: Elam û Asûr û Arpakşad û Lûd û Aram. 23 Û Lawên Aram: Ûs û Hûl û Geter û Maş. 24 Û Arpakşad bû bavê Şelah[4] û Şelah bû bavê Eber. 25 Û du lawê Eber bûn; navê

1 Yafet: Firehî, zêdeyî.

2 Qeraxên behran ve.

3 Sîdon: Bapîrê Saydayiyan bû.

4 Di Septûagînta de: Lawekî Arpakşad, bi navê Kenan bû. Ji Kenan jî lawekî ku navê wî Şelah e bû.

yekî Peleg[1] bû; ji ber ku rûyê erdê
di dema wî de hate parvekirinê û
navê birayê wî Yoktan bû. 26 Û
Yoktan, bapîrê Almodad û Şelef û
Hasarmavet û Yerah 27 û Hadoram
û Ûzal û Dîkla 28 û Obal û Abî-
maêl û Şeba 29 û Ofîr û Hawîla û
Yobab bû; hemûya vana ji nîjada
Yoktan bûn.
30 Û vana li rojhilatê, li herêma
çiyayî ya ku ji Meşa heta Sefar
dirêj dibe dijiyan. 31 Lawên Sem,
yê ku di welatê xwe de bi eşîran û
zimanan ve cuda bûne ev in.
32 Hemû ev mirovên ku paşî to-
fanê netewe bi netewe, qam bi
qam belavî rûyê erdê bûne, yên
ku li her aliyê rûyê erdê ve belav
bûne, ji nîjada Nûh hatine.

*Qûleya Babîlê*

11 Û hemû mirovên li dinê,
yek zimanî diaxifîn û go-
tinên wekî hev digotin. 2 Û dema
ber bi rojhilatê koç dikirin, di
herêma Şînarê de deştekê dîtin û
li wir bi cîh bûn.
3 Û ji hev û din re gotin: We-
rin, em kerpîç çêbikin û zehf
bikelînin! Û dêvla kevir kerpîç,
dêvla xercê jî zifta wan hebû. 4 Û
dawiyê gotin: Em ji xwe re baja-
rekî ava bikin. Qûleyeke bigihêje
ezmanan ava bikin û nav û deng
bidin. Bi vî awayî, em ê belavî
rûyê erdê nebin!
5 Û XUDAN, bona bajar û qûleya
ku mirovan çêkirine bibîne, daket
erdê. 6 Û XUDAN got: A vay, ne-
teweyek in û zimanekî hemûyên
wan heye û tiştê ku bona çêbikin
destpêkirine ev e; û ji tu tiştê ku
niha bona kirina wê nêt anîne
dê qet tiştek ji wan re neyê qe-
dexe kirin. 7 Werin, em dakevin
jêr û zimanê wan tevlihev bikin
ku, bila ji hev û din fêhm nekin!
8 Û bi vî awayî XUDAN wan li
rûyê erdê belav kirin û ava kiri-
na bajêr sekinand. 9 Bo vê yekê,
navê Babîlonê[2] dan bajêr. Ji ber
ku XUDAN zimanê hemû miro-
van li wir tevlihev kir û XUDAN
wan bi ser hemûya rûyê erdê ve
belav kir.

*Ji Sem heta Abram*

1.Dîr 1,17-27; Lûq 3,34-37

10 Çîroka nîjada Sem: Paşî to-
fanê du sed sal, gava Sem sed salî
bû û lawê wî Arpakşad hate dinê.
11 Û paşî bûyîna Arpakşad, Sem
pênc sed salê din jiyana xwe do-
mand. Û wekî din jî keç û lawên
wî çê bûn.
12 Û gava Arpakşad sîh û pênc
salî bû, lawê wî Şelah hate dinê.
13 Û paşî bûyîna Şelah, Arpakşad

1 Peleg: Parî bûn.
2 Babîlon: Bi fonetîkî, di Îbranîtî de gotina gelemşê di bîr tîne.

çar sed û sê salê din jiyana xwe
domand. Û wekî din jî keç û
lawên wî çê bûn[1].
14 Û gava Şelah sîh salî bû, lawê
wî Eber hate dinê. 15 Û paşî bûyî-
na Eber, Şelah çar sed û sê salê
din jiyana xwe domand. Û wekî
din jî keç û lawên wî çê bûn.
16 Û gava Eber sîh û çar salî bû,
lawê wî Peleg hate dinê. 17 Û
paşî bûyîna Peleg, Eber çar sed û
sîh salê din jiyana xwe domand.
Û wekî din jî keç û lawên wî
çê bûn.
18 Û gava Peleg sîh salî bû, lawê
wî Reû hate dinê. 19 Û paşî bûyî-
na Reû, Peleg du sed û neh salê
din jiyana xwe domand. Û wekî
din jî keç û lawên wî çê bûn.
20 Û gava Reû sîh û du salî bû, lawê
wî Serûg hate dinê. 21 Û paşî bûyî-
na Serûg, Reû du sed û heft salê din
jiyana xwe domand. Û wekî din jî
keç û lawên wî çê bûn.
22 Û gava Serûg sîh salî bû, lawê
wî Naxor hate dinê. 23 Û paşî
bûyîna Naxor, Serûg du sed salê
din jiyana xwe domand. Û wekî
din jî keç û lawên wî çê bûn.
24 Û gava Naxor bîst û neh salî
bû, lawê wî Têrah hate dinê.
25 Û paşî bûyîna Têrah, Naxor
sed û nozdeh salê din jiyana xwe
domand. Û wekî din jî keç û
lawên wî çê bûn.
26 Û Têrah heftê salî jiyiya û bû
bavê Abram, Naxor û Haran.
27 Û nifşeyên Têrah ev in: Têrah,
bavê Abram, Naxor û Haran bû.
Û Haran bû bavê Lût. 28 Û Ha-
ran, hîn bavê wî Têrah sax bû, li
welatê ku hatiye dinê, li bajarê
Ûr yê Keldaniyan de çû ser heqi-
ya xwe. 29 Û Abram û Naxor
zewicîn. Navê pîreka Abram Sa-
ray û navê ya Naxor jî Mîlqa bû.
Mîlqa, qîza Haranê bavê Îska bû.
30 Û Saray stewr bû, zarokê wê
çênedibû.
31 Û Têrah, lawê xwe Abram,
zazê xwe, Lûtê yê lawê Haran
e û bûka xwe, Saraya ku pîreka
Abram e girt cem xwe. Bona ku
herin welatê Kenanê, ji bajarê
Keldaniyan Ûrê ve cuda bûn. Çûn
Haranê û li wir bi cîh bûn. 32 Û
Têrah, paşî du sed û pênc salê ji-
yana xwe domand û li Haranê, çû
ser heqiya xwe.

*Banga ji Abram re*

1.Mûs 11,31-32; K.Şa 7,2-5; Îbr 11,8-14

12 Û XUDAN ji Abram re got:
Dev ji welatê xwe, gelê xwe,
mala bavê xwe berde û here axa
ku ez ê nîşanî te bidim. 2 Û ez ê

---

*1* Septûagînta: Gava Arpakşad sîh salî bû, lawê wî Kenan hate dinê. Paşî bûyîna Kenan, Arpakşad hîn çar sed û sîh sal jiyanê domand. Wekî din jî qîz û lawên wî bûn. Dema Kenan sed û sîh salî bû, lawê wî Şelah welidî. Paşî bûyîna Şelah, Kenan hîn sê sed û sîh sal jiyanê domand. Wekî din jî law û qîzên wî bûn. Binêre: Lûq:3:35-36.

te bikim neteweyek mezin û ez ê
te pîroz bikim û nav û deng bi te
bixim û tuyê bibe çavkaniya bere-
ketê! 3 Û ez ê yê ku te pîroz bike,
pîroz bikim. Û yê ku te bi nalet
bike, ez ê jî wan bi nalet bikim.
Û dê hemûya gelên li rûyê erdê bi
navdîtiya te bên pîroz kirin!
4 Û Abram, mîna ku XUDAN
emir da, derket rê. Lût jî bi wî
re çû. Û gava Abram ji Haranê
cuda bû, heftê û pênc salî bû. 5 Û
pîreka xwe Saray û biraziyê xwe
Lût û malên ku li Haranê qezenc
kiribû, xulamên ku bi dest ve xis-
tibû girt cem xwe û ber bi welatê
Kenanê ve derket rê. Û gîhaştin
welatê Kenanê.
6 Û Abram di welêt de heta ke-
lema More, ya ku li Şekemê ye
pêş ve çû. Û wê wextê Kenanî
di welêt de dijiyan. 7 Û XUDAN
bi Abram re xuyanî bû û got: Ez
ê van erdan bidim nifşeya te! Û
Abram, ji XUDANê ku ji wî re
xuya bûye re, li wir pêşkêşgehek
ava kir.
8 Û ji wir, ber bi herêma çiyayî ya
ku li rojhilata Beytelê ye ve çû.
Çadira xwe di nava Beytela ber bi
rojava û Bajarê Ayê ya ku ber bi
rojhilat dikeve ve danî. Û li wir,
pêşkêşgehekê ji XUDAN re çêkir
û li ber XUDAN geriya. 9 Û da-
wiyê bi sekin û çûnê ber bi Nege-
bê pêş ve çû.

*Abram li Misirê*

10 Û ji ber ku xelayek zor li welat
bû, Abram bona demek derbasî çû
Misirê. 11 Û dema nêzîkî Misirê
bûn, ji pîreka xwe Saray re got: A
vay, ez dizanim tu pîrekek xweşik
î. 12 Û dibe ku, Misirî te bibînin û
bi gotina: Vêya pîreka wî ye, min
bikujin û te sax bihêlin. 13 Ji kere-
ma xwe bibêje: Ez xwuşka wî me.
Ûsa ku, bila bi saya te bi qenciyê
ji min re bikin û canê min bijî.
14 Û dema Abram ket Misirê,
Misirî hay ji wan bûn ku pîreka
wî zehf xweşik e. 15 Û zilamên
Fîrawûn, yên ku pîrekê dîtin, pes-
nahiya xweşikya wê ji Fîrawûn re
kirin. Û pîrekê girtin qesrê. 16 Û
bona xatirê wê, Fîrawûn bi qencî
ji Abram re kir. Û Abram bû xwe-
dî dewar û ga û ker û dîl û cariye
û deve.
17 Û XUDAN ji ber pîreka Ab-
ram Saray, felaketên tirsehêz
anî ser Fîrawûn û maliyên wî.
18 Û Fîrawûn bangî Abram kir
û pirsa: Ev kirina te çî ye? ji wî
pirsî. Çima te negot ku Saray jina
te ye? 19 Çima te bi gotina: Sa-
ray xwuşka min e, destûrê da ku
ez bi wê re bizewicim? Û niha, a
vay, pîreka te, rahêle û here! 20 Û
Fîrawûn, bona Abram emir da zi-
lamên xwe. Û bi vî awayî Abram
û pîreka xwe, bi her tiştên ku lê
bûne xwedî şandin.

*Cihêbûna Abram û Lût*

13 Û Abram, tevî pîreka xwe û
her tiştên ku bi dest xistiye
ji Misirê cuda bû û ber bi Negebê
ve çû. Lût jî bi wî re bû. 2 Û Ab-
ram pirr dewlemend bû. Keriyên
wî, zêr û zîvên wî hebûn.
3 Û ji Negebê dest pê kir û bi koç
kirina ji cîhek, heta cîhekî din çû
heta Beytelê. Gîhaşt cîhê di nava
Beytel û Bajarê Ayê ya ku çadi-
ra xwe lê daniye de bû. 4 Çû ber
pêşkêşgeha ji berê ve çêkiriye û
Abram li wir, bangî XUDAN kir.
5 Dewar, ga û çadirên Lûtê ku
bi Abram re koç kiriye jî hebûn.
6 Û malên wan ewqas zêde bûn
ku, ax destûrê neda ku pev re bi-
jîn; nikarîbûn li cem hev bijîn.
7 Û di nava şivanên Abram û
şivanên Lût de şer derket. Û di
wan rojan de Kenanî û Perizî jî li
wir dijiyan.
8 Û Abram ji Lût re got: Em bi-
rayê hev in. Bo vê yekê, bila di
nava me de jî, di nava şivanên me
de jî şer dernekeve. 9 Ma hemû
erd ne li ber te ne? Rica dikim, ji
min cuda bibe! Ger tu ber bi aliyê
çep ve here, ez ê bi aliyê rast ve
herim. Ger tu ber bi aliyê rast ve
here, ez ê ber bi çepê ve herim.
10 Û Lût li dora xwe nihêrt.
Hemûya deşta Urdunê, mîna
bexçê XUDAN bû. Mîna gava
ber bi Soarê diçin, wekî zeviyên
Misirê. Li her derê pirr av hebû.
Berî ku XUDAN bajarê Sodom
û Gomora xera bike, deşt ûsa bû.
11 Û Lût, hemûya deşta Urdunê ji
xwe re bijart û ber bi rojhilatê ve
koç kir. Û ji hev û din veqetiyan.
12 Abram, li erdê Kenanê ve ma.
Lût di nava bajarên di deştê de
ne de bi cîh bû. Û li derekî nêzîkî
Sodomê ye çadira xwe danî. 13 Û
gelê Sodomê pirr xerab bûn. Û li
dijî XUDAN gunehên zehf mezin
dikirin.
14 Û paşî Lût ji Abram ve cuda
bû, XUDAN ji Abram re got: Ji
cîhê ku tu lê ye, li rojhilat, rojava,
bakur û başûr ve bi balkêşî binihê-
re! 15 Ji ber ev erdên ku tu dibî-
ne, ez ê heta bêdawîbûnê bidim
te û nifşeya te. 16 Û ez ê nîjada
te, mîna toza axê zêde bikim. Ûsa
ku, ger yek derkeve û toza axê ka-
ribe bijmêre, dê bikaribe nîjada te
jî bijmêre. 17 Rabe, erdên ku ez ê
bidim te ji serî heta dawî bigere.
18 Û Abram çadira xwe rakir û çû
kelemiya Mamre ya ku li Hebronê
ye bi cîh bû. Û li wir, pêşkêşgehekê,
ji XUDAN re ava kir.

*Abram Lût xelas dike*

14 Di vê navberê de, Amrafêlê
qiralê Şînarê, Aryoqê qi-
ralê Elasarê, Kedorlaomerê qiralê
Elamê û Tîdalê qiralê Goyîmê
2 li hemberî Berayê qiralê So-
domê, Bîrşayê qiralê Gomorayê,
Şînabê qiralê Admayê, Şemeberê

qiralê Seboyîmê û qiralê Be-
laê, (ev Soar e) ve şer vekiribûn.
3 Van hemûyan, li newala Sîdîmê
ya ku niha Gola Lût e, hêzên xwe
yek kiribûn. 4 Van qiralana donz-
deh sal di bin serweriya Kedor-
laomer de mabûn û sala sêzde-
han, serî li dijî wî hildabûn. 5 Û
di sala çardehan de Kedorlaomer
û qiralên din, yên ku piştgiriyê li
wî dikin hatin û li Aşterot-Karayî-
mê Refayiyan, li Hamê Zûziyan,
li Şave-Kîryatayîmê, Emlayiyan,
6 li Seîra herêma çiyayî ya ku heta
Eyl-Perana li qeraxa çolê ye, li
Horiyan xistin[1]. 7 Û ji wir vegeri-
yan û çûn Eyn-Mîşpatê (ev Qadeş
e). Hemû erdên Amalekiyan girtin
û li Amoriyên li Hasêson-Tamarê
dijîn jî xistin[2].
8 Û li ser vêya qiralên Sodom, Go-
mora û Adma û Seboyîm û Bela
(ev Soar e) derketin rê. 9 Û van her
pênc qiralana, li newala Sîdîmê,
li ber çar qiralî, Amrafêlê qiralê
Şînarê, Aryoqê qiralê Elasarê, Ke-
dorlaomerê qiralê Elamê û Tîdalê
qiralê Goyîmê ketin sazûmana şer.
10 Û newala Sîdîmê, bi kortalên
qetranê ve tijî bûn. Û dema qiralên
Sodom û Gomora direviyan, hinek
ji zilamên wan ve, ketin kortalê. Û
yên sax man jî ber bi çiyayan re-
viyan. 11 Û wan, hemû xwarin û
malên Sodom û Gomora birin û
çûn. 12 Û Lûtê biraziyê Abram û
malên wî jî bi xwe re birin. Ji ber
ku, ew jî li Sodomê dijiya.
13 Û yekî ku ji wir reviyaye û xe-
las bûyî, hate û ji Abramê Îbranî
re rewşa wir got. Û Abram, di
kelemiya Mamrê Amorî yê ku
birayê Eşqol û Aner e de dijiya.
Û hemûya vana ji aliyê Abram
bûn. 14 Û Abram, gava bihîst ku
birayê[3] wî Lût dîl ketiye, sê sed
û hîjdeh zilamên xwe yên ku li
mala wî hatine dinê[4] û gîhaştine,
girt cem xwe û heta Danê her çar
qiralî qewirand. 15 Zilamên xwe
bi komelan cuda kir û şevê êrîş
kir û wan xera kir û heta Hova
ya li bakurê Şamê ye bi pey wan
beziya[5]. 16 Û Abram, hemû malê
ku hatiye talan kirin, him jî birayê
xwe Lût, him jî malên Lût, pîre-
kan û gel vegerand û anî.

*Melkîsedek Abram pîroz dike*

Îbr 7; Zeb 110,4

17 Û gava Abram, li Kedorlao-
mer û qiralên piştgirê wî ne, xist[6]
û vegeriya, qiralê Sodomê bona
ku pêşwaziyê ji wî re bike çû
geliya Şavê, ev Geliya Qiral e.
18 Û qiralê Salemê Melkîsedekê
ku kahînê Xwedayê Mezin e, nan
û xemrê anî.

---

1 Şikandin, an jî: Mexlûb kirin.
2 An jî: Rastî têkçûnê anîn.
3 Biraziyê wî.
4 Zayîne, welidîne.
5 Wan qewirandin.
6 An jî: Rastî xerabûnê (binketinê) anî.

19 Û Abram pîroz kir û wusa got:
Bila Xwedayê bilind yê ku erd û
ezman afirandiye, Abram pîroz
bike.
20 Û bila pesnahî ji Xwedayê bi-
lind, yê ku neyarên wî daye destê
wî re be! Û li ser vêya, Abram de-
heka her tiştî da Melkîsedek.
21 Û qiralê Sodomê, ji Abram re
got: Canan bide min, bila mal ji te
re bimînin.
22 Û Abram ji qiralê Sodomê re;
bi gotina: Ez li ber XUDAN Xwe-
dayê ku erd û ezmanan afirandiye
sondê dixwim[1] ku, tu tiştê aidî
te ne, 23 ne tayekî, ne jî qeyta-
na çaroxê ranahêlim! bersivê da.
Ûsa ku, tu nebêje: Min Abram
dewlemend kiriye. 24 Lê xwarina
zilamên min, xeynî vêya ne! Ya
din jî, Aner, Eşqol û Mamreyê ku
piştgiriyê li min kirine bila ya ku
dikeve para xwe bigirin!

*Peymana ku Xudan bi Abram re dike*

Rom 4; Gal 3,6-9

15 Paşî vêya, XUDAN di
xewn û xeyalekê de bi vî
awayî bangî Abram kir: Metirse,
Abram! Mertalê te ez im. Dê xe-
lata te zehf mezin bibe.
2 Abram got: Ya Xudan, XUDAN,
tuyê çi bidî min? Ez nebûm xwedî
zarok. Dê Mala min, ji Eliyezerê
Şamî re bimîne. 3 Û Abram got:
Ji ber ku te zarokekî neda min û
dê xizmetkarekî mala min bibe
mêraskerê min.
4 Û a vay, ev gotina XUDAN ji
wî re hat got: Ew ê nebe mêras-
kerê te, dê zarokê teyî derûn[2] bibe
mêraskerê te. 5 Û ew derxist ji
derve û got: Li ezmana binêre!
Ma tu dikarî sitêrkan bijmêre? A
vay, dê nîjada te mîna wan zêde
bibe!
6 Û ew bi XUDAN ve ewle bû[3].
XUDAN vêya rastî hesiband.
7 Û XUDAN ji Abram re got:
XUDANê ku bona erda bi mêrasî
bide te, te ji bajarê Ûr yê Kildani-
yan derxistiye ez im.
8 Û Abram, pirsa: Ya Xudan, XU-
DAN, ez ê çawa bizanibim ku van
erdna bi mêrasî girtime? pirsî.
9 Û wî (XUDAN) ji wî re got: Bi-
zinek, beranek û nogineke ji min
re bîne. Bila hemû jî sê salî bin.
Ya din, qumriyek û çêlikeke ke-
vokê jî ji min re bîne.
10 Û wî vana hemûyan ji wî re
girt û ji navê ve jê kir û pariyan li
hemberên hev rêz kir; lê belê civî-
kan jê nekir. 11 Û civîkên dirinde[4]
daketin ser laşên wan û Abram ew
qewirandin.
12 Û dema roj diçû ava, Abram
ket xewek kûr. Tariyek tirsehêz

---

1 An jî: Destê xwe rakirim.
2 Esil.
3 Ewle bû, an jî: Bawer kir.
4 Hov.

daket ser wî. 13 Û wî (XUDAN)
ji Abram re ûsa got: Vêya baş bi-
zanibe ku, dê nîjada te li welatekî
biyan, mîna xerîban bijî. Û dê çar
sed salî dîlitiyê bike û zordestiyê
bibîne. 14 Lê belê ez ê netewa ku
nîjada te jê re dîlitiyê dike, bi ceza
bikim. Û dawiyê dê nîjada te, ji
wir bi hebûna gellek malî cuda
bibe. 15 Lê belê tuyê jî, di nava
dilxweşiyê de bigihêje bapîrên
xwe. Û di kalîtiyek qenc de[1] tuyê
bê binax kirin. 16 Û dê nifşeya
çaremîn ya nîjada te vegere vir. Ji
ber, xerabiya ku Amoriyan kiriye,
hîn temam nebûye[2].
17 Û gava roj çû ava û tarî daket,
bi manqilekî bi dûh û meşaleyeke[3]
bi agir hatin xuya bûn û di nava
pariyên heywanên ku hatine jê
kirin de derbas bûn. 18 Wê roja,
XUDAN bi Abram re peymanê çê
kir û ji wî re wusa got: Ez ê van
erdên ji çemê Misirê, heta çemê
Ferata mezin, van erdên ku yên
19 Keniyan û Kenîziyan û Qad-
moniyan û 20 Hîtîtiyan û Perîzi-
yan û Refayiyan 21 û Amoriyan û
Kenaniyan û Gîrgaşiyan û Yebû-
siyan bidim nîjada te.

*Hacirê û Simayîl*

16 Û pîreka wî Saray, zaroka
nedabû Abram. Û cariyekî
Saray ya ji Misirê, bi navê Ha-
cirê hebû. 2 Saray ji Abram re
got: XUDAN astengiyê derxist
ku ez nebim xwedî zarok. Bi ke-
rema xwe, bi cariya min re rake-
ve. Dibe ku bi vê rêya ez bibim
xwedî zarokekî. Û Abram guh da
gotina Saray. 3 Û Saray, cariya
xwe yî ji Misirê Hacirê bi jinitî
da mêrê xwe Abram. Ev bûyera,
paşî ku Abram deh sal li Kenanê
jiya bû. 4 Û ew bi Hacirê re raket
û Hacirê ducanî ma. Hacirê, gava
fêhm kir ku ducanî maye û dest
pê kir û xanima xwe biçûk dît.
5 Û Saray ji Abram re got: Ev
neheqiya ku hatiye serê min, bila
bê serê te! Min cariya xwe xist
himbêza te. Gava bi ducani bûna
xwe fêhm kir, dest pê kir û min
biçûk dît. Bila XUDAN di nava
me her duyan de qirarê bide!
6 Lê Abram ji Saray re got: A vay,
cariya te di destê te de ye. Tu çi li
cîh dibîne ûsa bike. Bi vî awayî
Saray bi dijwarî li cariya xwe kir.
Hacirê ji cem wê reviya.
7 Û milyaketê XUDAN, Hacirê li
çolê, li ser kaniyekê, li ser kaniya
ku li ser rêya Şûrê ye dît. 8 Û ji
wê re got: Hacirê ya cariya Saray,
tu ji ku tê û diçe ku? Hacirê, bi
gotina: Ez ji xanima xwe Saray ve
direvim bersivê da.

1 An jî: Di temenek qenc de, (di kaltiya xwe de).
2 An jî: Negihîştiye serê (şaxa) xwe.
3 Pêtalek.

9 Milyaketê XUDAN got: Vegere
xanima xwe û hustî ji wê re xwar
bike. 10 Û milyaketê XUDAN ji
wê re got: Ez ê nîjada te ewqasî
zêde bikim ku, tu kes dê nikaribe
bijmêre.
11 Û milyaketê XUDAN ji wê re
got: A vay, tu ducanî ye, dê lawekî
te çê bibe û tuyê navê wî Simayîl[1]
deyne. Ji ber ku XUDAN, qêrina
te ya ku di nava tengasiyê de ye
bihîst. 12 Û dê lawê te bibe zila-
mek mîna kerê yawanî[2]; dê ew ê li
hemberê her kesî, her kes jî li dijî
wî rabin. Û dê bi hemû birayên
xwe re, di nava keftûleftê de bijî[3].
13 Û Hacirê, bi gotina: Gelo bi
rastî jî min Xwedayê ku min dibî-
ne dît? navê El-Roî[4] da XUDANê
ku pê re diaxife. 14 Bo vê yekê
wê navê Beer-Lahay-Roî[5] li bîrê
kir; a vay, ew di nava Qadeş û Be-
redê de ye.
15 Û Hacirê lawikekî ji Abram
re anî dinê. Abram navê Simayîl
li lawik kir. 16 Û gava Hacirê Si-
mayîl anî dinê, Abram heyştê û
şeş salî bû.

*Sunet: Nîşana Peymanê*

17 Û gava Abram nod û neh
salî bû, XUDAN bi wî
xuyanî bû û ji wî re got: Ez Xwe-
dayê ku hêza wî têra her tiştî
dike me. Di rêya min de bimeşe
û bêqisûr bibe. 2 Û ez ê peyma-
na ku bi te re kirime bidomînim
û nîjada te, heta ku tu bibêje zêde
bikim.
3 Û Abram bi dev û rû çû erdê. Û
Xwedê bi wî re axifî û got: 4 Pey-
mana ku bi te re çêkirime ev e:
Tuyê bibe bavê gellek neteweyan.
5 Û Êdî navê te ne Abram e[6], lê
dê Birahîm be. Ji ber ku te kirim
bavê gellek neteweyî. 6 Û ez ê te
zehf bi berdar bikim. Û dê ji nîjada
te netewe biwelidin û qiral derke-
vin. 7 Ez ê peymana xwe bi te re
û nîjada te re di tûmiya nifşeyan
de, heta bêdawîbûnê bidomînim.
Û ez ê bibim Xwedayê te û paşî
te jî yê nîjada te. 8 Û van erdan,
yên ku hûn bi biyanî li ser dijîn û
hemûya welatê Kenanê, bona ku
heta bêdawîbûnê bibe milkê we,
ez ê bidim te û nîjada te. Û ez ê
bibim Xwedayê wan.
9 Û Xwedê ji Birahîm re got:
Û divê tu û nîjada te, di tûmi-
ya nifşeyan de bi peymana min
ve girêdayî bimînin. 10 Şerta
peymana ku min bi te û nîjada
te re danîne ev e: Dê hemû zi-

1 Simayîl: Xwedê dibihîze.
2 Hov.
3 An jî: Dê li rojhilata cîhê ku hemû birayên wî lê dijîn bi cîh bibe.
4 El-Roî: Xwedayê dibîne.
5 Beer-Lahay-Roî: Bîra kesên Xwedê dîtine û sax mayîne.
6 Abram: Bavê bilind. Bi Îbranîtî Abraham, tê mana, bavê gellekan.

lamên ku di nav we de ne, bên
sunet kirin. 11 Û divê hûn di
çermê pêşiyê de sunet bibin û
dê sunet bibe nîşana peymana
ku di nav me de ye. 12 Û heta
dîlên ku li mala we hatine dinê,
an jî ji kesekî ne ji nîjada we ye
hatine stendin jî di nav we de,
divê her zarokê mêr yê heyşt rojî
bên sunet kirin. Ev ê di tûmiya
nifşeyên we de jî bidome. 13 Û
heçî zarokên ku di mala we de
bûyîne an jî we wan stendiye, bi
biryarî dê bên sunet kirin. Û ev
nîşana ku di bedena we de ye,
dê bibe nîşana peymana min ya
ku dê heta bêdawibûnê bidome.
14 Heçî zilamê ku nehatiye su-
net kirin, dê ji nav gelê xwe ve
bête avêtin, ji ber ûsa tê ku wî
peymana min xera kiriye!
15 Û Xwedê ji Birahîm re got:
Gava em bên pîreka te Saray, êdî
tuyê ji wê re nebêje Saray. Lê ji
niha ve pêv dê navê wê bibe Sara[1].
16 Û ez ê wê pîroz bikim û ji wê,
ez ê lawekî bidim te. Belê, ez ê
wê pîroz bikim û ew ê bibe diya
neteweyan. Dê qiralên neteweyan
ji nîjada wê ve derkevin.
17 Û Birahîm ser dev û rû xwe
avêt erdê û keniya, ji hundirê xwe
ve got: Ma zilamekî sed salî di-
kare bibe xwedî zarok? Û Saraya
nod salî dikare zaroka bîne? 18 Û
dawiyê ji Xwedê re got: Xwezîka
te Simayîl bi mêraskeriya min qe-
bûl bikira!
19 Û Xwedê got: Na! Lê belê dê
pîreka te Sara lawekî ji te re bîne.
Û tuyê navê wî Îshaq[2] deyne. Ez
ê bi wî re û nîjada wî re peyma-
na xwe bêdawî bidomînim. 20 Lê
belê ger em bên Simayîl, te bihîs-
tim. A vay, wî pîroz kirim; wî bi
berdar bikim û nîjada wî heta ku
tu bibêje zêde bikim. Ew ê bibe
bavê donzdeh begî. Ez ê nîjada
wî bikim neteweyek mezin. 21 Lê
belê ez ê peymana xwe, bi Îshaqê
ku yê salek din van wextna Sara
dê bîne dinê re bidomînim. 22 Û
gava Xwedê axaftina xwe yî bi
Birahîm re qedand, ji wir cuda bû
û bi jor ve vekişî.
23 Û Birahîm, hemû zilamên li
mala xwe ne, lawê xwe Simayîl
û xulamên li mala wî bûyîne an jî
ji aliyê wî ve hatine stendin, mîna
ku Xwedê emir dabû wî, di eynî
rojê de da sunet kirin. 24 Û gava
Birahîm sunet bû, nod û neh salî
bû. 25 Û gava lawê wî Simayîl
sunet bû, sêzdeh salî bû. 26 Bi-
rahîm, tevî lawê xwe Simayîl,
di yek rojê de hatin sunet kirin.
27 Û hemû zilamên di mala wi de
ne, yên ku li mala wî bûyîne û ji
xerîban ve hatine stendin, tevî wî
sunet bûn.

1 Sara: Pirenses.

2 Îshaq, kenîn.

*Sê Mêvan*

1.Mûs 21,1-7

18 Û gava, di saetên germ yên
rojê de, Birahîm li derê ça-
dira xwe yî di kelemiya Mamrê de
ye, rûniştibû, XUDAN xuyanî wî
bû. 2 Û Birahîm dît ku li ber wî sê
zilam sekinîne. Û çawa ku wan dît
û nedît, bona pêşwaziyê ji wan re
bike ji derê çadirê ve baz da. Xwe
avêt erdê û got: 3 Ya efendiyê
min, ger ez di çavê te de xêrê dîti-
bim, bi kerema xwe ji cem qûlê
xwe cuda nebe! 4 Ez hinekî avê
bidim anîn, lingên xwe bişon. Û li
binya vî darî rawestin. 5 Madem
ku hûn mêvan hatine qûlê xwe,
bihêlin ez ji we re pariyek nan[1]
bînim. Paşî hinek rawestinê hûn ê
rêya xwe bidomînin. Û wan gotin:
Belê, bila mîna gotina te be, wusa
bike. 6 Birahîm, hema çû çadirê,
cem Sara. Ji wê re got: Hema sê
olçek[2] arvanê zirav rahêle û bistirê
û nanê şikeva çêke! 7 Û Birahîm,
ber bi gayan ve baz da. Û golikek
teze û qelew bijart û da xulamê
xwe. Û xulam hema golikê amade
kir. 8 Û Birahîm, golika ku hatiye
amade kirin, tevî dew û şîr bir û
danî li ber wan. Û gava wan di-
xwar, ew jî li cem wan di bin darê
de sekinî.
9 Û wan ji wî re gotin: Ka, jina te
Sara li ku derê ye?
Û wî (Birahîm) got: A vay, li
çadirê ye. 10 Û wî got: Sala ku
were, di van deman de bi biryarî
ez ê vegerim cem te. Wê gavê dê
lawek jina te Sara hebe. Û Sara
di paş wî de, li ber deriyê çadirê
sekinîbû û guhdarî dikir. 11 Û
Birahîm û Sara kalepîr bûbûn û
temenên wan gellekî buhurî bû.
Sara ji keçxwîniyê ve hatibû bir-
rîn. 12 Û Sara, di dilê xwe de ke-
niya û bi gotina: Gelo ez paşî vî
temenê xwe dikarim dilxweşiyê
tahm bikim? fikirî. Di ser de,
efendiyê min jî pîr e!
13 Û XUDAN ji Birahîm re got:
Sara çima bi gotina: Ma bi rastî
jî ez ê paşî vî temenê xwe bibim
xwedî zarok keniya? 14 Gelo
bona XUDAN, tiştekî bêîmkan
heye? Di dema ku hatiye bijartin
de, salekî din di van wextan de,
gava ez vegerim cem te, dê lawekî
Sara hebe. 15 Û Sara tirsiya, bi
gotina: Ez nekeniyam! derew got.
Lê belê wî got: Na, tu keniya!

*Birahîm, bona Sodomê lava dike*

Cihû 5,16-18

16 Û gava wan zilamana ji wir
cuda dibûn û bi ber ve Sodomê
nihêrtin. Û Birahîm jî, bona
ku wan bi rê bike, bi wan re
dimeşiya. 17 Û XUDAN got: Ma
ez ê tiştên ku bikim, ji Birahîm ve

1 Yanê hinek tiştên xwarinê.

2 Sê olçek: Bi Îbranîtî, sê sea, nêzîkî 16 kîlo.

veşêrim? 18 Bê şik, dê ji Birahîm
ve neteweyek xurt û mezin biafi-
re, hemûya neteweyên li rûyê erdê
ne, dê bi navdîtiya wî bên pîroz
kirin! 19 Ji ber min Birahîm, bona
ku kirina yê rastî û dadî di rêya
min de meşandinê hînî lawên xwe
û nîjada xwe bike û emir bide wan
bijart. Ûsa ku, ez soza ku dayîme
wî bînim cîh.
20 Û XUDAN got: Sodom û Go-
mora di bin sûcdariyek mezin de
ne. Û bona ku gunehên wan zehf
giran e. 21 Bo vê yekê, ez ê niha
dakevim û binêrim. Gelo sûcdari-
yên ku bihîstime rast in an jî ne
rast in ez ê bibînim. Û ez ê kirin
an jî nekirina wan fêhm bikim.
22 Û zilam ji wir cuda bûn û ber
bi Sodomê ve çûn. Lê belê Bi-
rahîm di hizûra XUDAN de ma[1].
23 Û Birahîm nêzîkî XUDAN bû
û got: Ma tuyê biheq û neheq pev
re tune bikî? 24 Em bibêjin di ba-
jêr de pêncî kesên rast hene. Tuyê
bi rastî jî wir tune bikî? Bona xa-
tirê pêncî kesê rast, tuyê li bajêr
neborînî? 25 Bila ev li dûrî te be;
bila kirina biheq û neheq yek we-
zinê û li cem neheq, kuştina biheq
jî bila ji te dûr bimîne! Ma yê ku
hemûya dinê daraz dike, divê ne
bi dadî be?
26 Û XUDAN, bi gotina: Ger ez li
Sodomê pêncî kesê rast bibînim,
ez ê bona xatirê wan, li hemûya
bajêr ve biborînim! bersivê da.
27 Û Birahîm got: Ez toz û xwelî
me, ez yekî tune me. Lê belê ez ê
metirsiya bi XUDAN re axaftinê
bidim xuya kirin! 28 Em bibêjin
çel û pênc kesên rast hene[2], ma
tuyê bona pênc kesî, hemûya ba-
jêr tune bikî?
Û wî got: Ger ez li bajêr, çel û
pênc kesê rast bibînim, ez ê wir
tune nekim! 29 Carek din ji wî
re got: Em bibêjin li wê derê çel
kes hene. Û wî got: Û ez ê ji bona
xatirê çel kesan nekim! 30 Û wî
got: Ya XUDAN, hêrs nebe, lê
belê em bibêjin sîh kes hene? Û
wî bi gotina: Ger ez li bajêr, sîh
kesê rast bibînim, ez ê destî bajêr
nedim bersivê da.
31 Û wî got: Ya XUDAN, ji kere-
ma xwe, li metirsiya axaftina min
biborîne! Ger tu bîst kesî bibînî?
Û wî bi gotina: Ez ê bona xatirê
bîst kesî, bajêr tune nekim! bersi-
vê da.
32 Û wî got: Ya XUDAN, hêrs
nebe, lê belê ez ê carekî din bi-
axifim. Ger tu deh kesî bibîn î?
Û wî bi gotina: Ez ê bona xatirê
deh kesî bajêr tune nekim! ber-
sivê da.
33 Û gava XUDAN, axaftina xwe
ya bi Birahîm re qedand, ji wir çû,
Birahîm jî vegeriya çadira xwe.

1 Wekî xwendinên din; XUDAN li ber Birahîm ma.
2 An jî: Ji pênce kesên rast pênc kes kêm in.

*Sodom û Gomora têk diçe*
5.Mûs 29,23; 2.Pêt 2,6

19 Û ew du milyaket, êvarî
gîhaştin Sodomê. Û Lût
li deriyê bajêr de rûniştibû. Û
çawa ku Lût wan dît û nedît, bona
pêşwaziya wan rabû ser pêlan.
Bi erdê ve çû û 2 a vay, Efendi-
yên min! got. Keremî mala qûlê
xwe bibin. Û lingên xwe bişon
û şevê biborînin. Û hûn ê sibehê
zû hişyar bibin û di rêya xwe de
bidomînin. Lê belê wan gotin:
Nabe! Em ê şevê, di qada bajêr
de biborînin. 3 Lê belê Lût, pirr di
ber xwe de da. Û tevî wî çûn mala
wî. Û wî xwarinê ji wan re amade
kir, nanê şikeva çêkir û xwarin.
4 Lê belê berî ku ew rakevin, zi-
lamên bajêr, ji her taxa Sodomê,
ciwan û pîr, hemûya zilamên ba-
jêr dora malê girtin. 5 Û bangî
Lût kirin û pirsa: Zilamên ku
îşev hatin cem te, li ku derê ne?
pirsîn. Wan bîne ku em bi wan
re rakevin! 6 Û Lût derket derve,
cem wan û li pêy xwe derî girt.
7 Û got: Birano, ji kerema xwe vê
xerabiyê mekin! 8 A vay, du keçi-
kên min yên ku hîn wecê zilaman
nedîtine hene. Ez wan ji we re bî-
nim, hûn çi dixwazin bikin. Bes
e ku, destî van zilamana nedin. Ji
ber ku ew mêvanên min in, hatin
binya xaniyê min! 9 Lê belê wan
bi gotina: Ji ber me vekişe! bersi-
vê danê. Û wan got: Ev zilam ji
derve hate vir û niha xwe dadger
dihesibîne! Em ê niha ji wan zê-
detir xirabiyê bi te bikin. Û bi tan
dana Lût, bona ku derî bişkînin
xwe radan. 10 Lê belê zilamên
hundirê destê xwe dirêj kirin û
Lût girtin hundirê xanî, cem xwe
û deriyan girtin. 11 Û zilamên ku
xwe sipartibûn derî jî, biçûk û
mezin, hemû kor kirin. Ûsa ku, ji
bona dîtina derî westiyan[1].
12 Û zilaman, ji Lût re pirsa: Wekî
din, kî yî te li vir heye? pirsîn.
Lawên xwe, qîzên xwe, zavên
xwe, di bajêr de her kî yê ku aidî
te hebin, wan derxe derve! 13 Ji
ber ku em ê vir tune bikin. Ji ber
ku XUDAN, di derheqê vî gelî
de, pirr sûcdariyên xerab bihîst. Û
XUDAN bona ku bajêr tune bike,
me şandin. 14 Û Lût derket derve
û ji zavayên ku dê bi qîzên wî re
bizewicin re axifî û got: Rabin, ji
vê derê birevin! Ji ber ku dê XU-
DAN bajêr wêran bike! Lê belê di
çavê zavayên xwe de mîna ku he-
nekan dike, hate xuya kirin. 15 Û
dema berbang diavêt, milyaketan
bi gotina: Rabe, jina xwe û her du
qîzên xwe rahêje û hema ji vir ve
dûr biçe! bi ser Lût ve çûn. Ya na,
gava bajêr ceza xwe bibîne, tuyê jî
ji canê xwe ve bibî! 16 Lê belê wî
bi giranî ve kir. Û XUDAN xweste
ku wî biparêzîne. Zilaman bi destê

1 Êdî nikarîbûn derî bidîtina.

Lût û her du qîzên wî ve girtin û
wan derxistin derveyî bajêr.
17 Û gava derketin derveyî bajêr,
yek ji zilaman, ji Lût re got: Baz
de, canê xwe xelas bike! Û li pêy
xwe nenihêre! Li tu derê vê deştê
ve nesekine! Ber bi çiya ve bire-
ve, ya na, tuyê bimire û biçe! 18 Û
Lût; bersiva: Eman efendiyê min!
da wî. 19 A vay, hûn niha ji min
qûlê xwe ve dilxweş man û bi xe-
las kirina canê min, we qenciyek
mezin bi min ve kirin. Lê belê ez
nikarim ber bi çiyayan ve birevim.
Ji ber ku dê felaket bigihêje min
û ez ê bimirim. 20 Binêrin, li vê
nêzîka, bajarek ya ku ez dikarim
birevimê heye, bajarek biçûk e.
Destûrê bidin, ez birevim wir û
canê xwe xelas bikim! Ma ew ne
biçûk e? 21 Û ji wî re got: Belê,
ez xwesteka te qebûl dikim. Ez
wî bajarî xera nakim. 22 De lez
bike, hema bireve! Ji ber, heta ku
tu negihêje wir, ez nikarim tiştekî
bikim. Bo vê yekê navê Soarê[1]
dan wî bajarî.
23 Û gava Lût gîhaştibû Soarê,
roj hilatibû. 24 Û XUDAN, bi
ser Sodom û Gomorayê ji aliyê
XUDAN ji ezman ve, kewkurda
bi agir barand. 25 Û van bajaran
û hemûya deştê û hemû mirovên
li wir û hemû nebatan[2] tune ki-
rin. 26 Lê belê pîreka Lût, ya ku
li pêy wî diçû, gava vegeriya û li
pêy xwe nihêrt, bû stûnekî xwê.
27 Û Birahîm, sibehê zû rabû
û çû cîhê ku li hizûra XUDAN
mabû. 28 Û berbi Sodom û Go-
mora û berbi hemûya welatê deştê
ve nihêrt û dît û a vay, dûhê erdê
mîna dûhê tifikê[3] derdiket.
29 Û gava Xwedê, bajarên li deştê
tune dikir; Xwedê, Birahîm di bîra
xwe de anî û gava bajarên ku Lût
di wan de dijiya tune dikir, Lût
derxistibû derveyî vê felaketê.

*Lût û Qîzên wî*

3.Mûs 23,2-3

30 Û Lût ji Soarê derket û li çiyê
rûnişt û her du qîzên wî bi wî re
bûn; ji ber ku li Soarê mayînê ve
tirsiya û ew û her du qîzên wî li
şikeftê dest bi jiyanê ve kirin. 31 Û
qîza mezin, ji ya biçûk re got: Bavê
me pîr bûye. Û li gor kevneşopa
dinê, zilamên ku bi me re rakevin
li vir nînin. 32 Were, em xemrê
bi bavê xwe ve bidin vexwarin û
bona ku nîjada xwe bijînin, bi wî re
rakevin. 33 Û wê şevê xemrê dan
bavên xwe. Û qîzika mezin çû û
bi bavê xwe re raket. Lê belê hayê
Lût, ji raketin û rabûnê ve tune
bû. 34 Û roja din qîza mezin, ji ya
biçûk re got: Doh şev, ez bi bavê

1 Soar: Biçûk.
2 Gîhayan.
3 An jî: Hêtûna helandina madenan.

xwe re raketim. Îşev jî em xemrê
bi wî re bidin vexwarin. Û bona
ku em nîjada xwe bidomînin, tu
jî bi wî re rakeve. 35 Û wê şevê jî
xemrê dan bavê xwe û qîza biçûk
bi bavê xwe re raket. Lê belê hayê
Lût, ji raketin û rabûnê ve tunebû.
36 Bi vî awayî, her du qîzên Lût
jî ji bavên xwe yî heq ve ducanî
bûn. 37 Û qîza mezin, lawek
anî dinê û navê Moab li wî kir.
Moab[1], bavê Moabiyên îroyîn e.
38 Û lawek qîza biçûk jî çêbû û
navê Ben-Ammî[2] li wî kir. Ew jî
bapîrê Ammoniyên îroyîn e.

*Birahîm û Abîmelek*

1.Mûs 26,1-11; Zeb 105,12-15

20 Birahîm ji wir[3], ber bi
başûrê[4] ve koç kir. Û di
navbera bajarên Kadeş û Sûrê de
bi cîh bû. Û li Gêrarê mêvan ma.
2 Û bona jina xwe Sara got: Ev
pîrek xwuşka min e. Û li ser vêya,
qiralê Gêrarê Abîmelek, zilaman
şand û Sara anî.
3 Lê belê Xwedê, şev di xewnê de
xwe rê Abîmelek da û got: Bona
ku te vê pîrekê stendiye, a vay,
tuyê bimire. Ji ber ku ew pîrekek
bi zewac e.
4 Abîmelek hîn dest Sara neda
bû. Û got: Ya XUDAN, ma tuyê
neteweyek bêsûc jî tune bikî?
5 Ma Birahîm, bi xwe ji min re:
Ev pîreka xwuşka min e ne got? Û
pîrek jî, bona Birahîm ew birayê
min e got. Min jî bi ûcdanê paqij û
bi destên bê sûc vêya kir.
6 Û Xwedê di xewna wî de ji wî
re got: Ez dizanim ku te bi ûcdanê
paqij vêya kiriye. Û ez jî bo vê
yekê, bona ku tu li dijî min gu-
nehan nekî, te dam sekinandin,
destûrê nedam ku tu destê xwe
li pîrekê bixinî. 7 Û niha pîrekê
vegerîne mêrê wê. Ji ber ku ew
peyxamberek e. Û dê bona te dua
bike û tu namirî. Lê belê ger tu
pîrekê venegerînî, dê tu jî û her
kesên aidî tene jî bimirin, tu bi
vêya bizanibe!
8 Û Abîmelek, sibehê zû rabû û
bangî hemû zilamên xwe kir û
tiştên ku bûne û qediyane ji wan re
got. Û zilaman zehf tirsiyan. 9 Û
Abîmelek bangî Birahîm kir û got:
Te çi bi me kir? Ma min çi neheqi-
yê ji te re kiriye ku te min û qira-
letiya min ber bi gunehek ûsa ve
ajot? Ev karê ku te bi min kir, ne
karek kirinê ye. 10 Û Abîmelek ji
Birahîm re got: Armanca te çibû, te
çima vêya kir?
11 Û Birahîm bi vî awayî bersivê
da: Ji ber ku li vir qet tirsa Xwedê
nîne; ez ûsa fikirîm û gotim, dibe
ku li vir ji ber jina min, min biku-

---

1 Moab: Ji bav.
2 Ben-Ammî: Lawê gelê min.
3 Ji Mamrê.
4 Negevê.

jin. 12 Û di ser de, bi rastî jî Sara
xwuşka min e. Bavê me yek, lê
diya me cuda ye. Û ew bû pîre-
ka min. 13 Û gava Xwedê, min ji
mala bavê min ve şand biyaniyê,
min ji wê re got: Tuyê bi vî awayî
hez kirina xwe nîşanî min bide. Li
her derê ku ez biçim, tuyê ji bo
min bibêje: Ew birayê min e!
14 Û Abîmelek, Saraya jina Bi-
rahîm, li wî vegerand. Û wekî din,
dewar û ga, kole û cariyan jî dan
wî. 15 Û Abîmelek ji Birahîm re
got: A vay, welatê min li ber te ye;
tu ku derê dixwaze, here li wir bi
cîh bibe!
16 Û ji Sara re jî got: A vay, hezar
parî zîvî dam birayê te. A vay, ev
ji bo yên ku li cem te ne, şahdeya
bêsûciya te ye. Û bila her kes bi-
zanibe ku tu bê sûc î!
17 Û Birahîm ji Xwedê re dua kir
û Xwedê şîfê da jin û cariyên Abî-
melek û bûn Xwedî zarok. 18 Ji
ber ku Xwedê, bona Saraya jina
Birahîm, ketibû ber ducanîbûna
hemû pîrekên li mala Abîmelek
in.

*Bûyîna Îshaq*

1.Mûs 17,15-16; 18,9-10; Îbr 11,11-12

21 Û XUDAN li gor ku soz
dabû qenciyê bi Sara ve kir
û soza xwe anî cîh. 2 Û Sara du-
canî bû û di dema kalepîriya Bi-
rahîm de, tam di wexta ku Xwedê
dabû xuya kirin de lawekî ji wî re
anî dinê. 3 Û Birahîm, navê Îshaq
li lawê ku Sara anîbû dinê kir. 4 Û
mîna ku Xwedê emir dabûyê, hîn
lawê wî Îshaq heyşt rojî bû, wî su-
net kir. 5 Û gava Îshaq bû, Birahîm
sed salî bû.
6 Û Sara got: Xwedê wecê min da
kenandin, dê hemû kesên ku vêya
bibihîzin, bi min re bikenin. 7 Ma
kî ji Birahîm re digot; dê Sara şîr
di pîritiya wî de, bide zarokan?
Ji ber ku di dema kalbûna wî de,
lawekî ji wî re anîm dinê. 8 Û La-
wik mezin bû û gava roja ji şîr ve
hate birrîn, Birahîm dawetek me-
zin danî.

*Hacir û Simayîl têne bidûrxistin*

1.Mûs 16; Gal 4,21-31

9 Lê belê Sara gava dît, Simayîlê
ku Hacira Misirî ji Birahîm re
aniyê dinê, henekê xwe bi wê re
dike; 10 ji Birahîm re got: Vê ca-
riyê û lawê wê biqewirîne. Ji ber
ku bila lawê vê cariyê, nebe şirîkê
mêrasa lawê min Îshaq!
11 Û vêya zehf Birahîm kesirand, ji
ber ku Simayîl jî lawê wî bû. 12 Lê
belê Xwedê ji Birahîm re got: Bona
lawê xwe û cariya xwe nekesire.
Gotina Sara guhdarî bike. Ji ber ku,
dê neteweya te bi Îshaq re bidome.
13 Û ez ê ji lawê cariyê ve jî nete-
weyekê biafirînim. Ji ber ku ew jî ji
neteweya te ye.
14 Û Birahîm sibehê zû rabû û
hinek xwarin, meşkek jî av ama-

de kir û avêt pişta Hacirê. Lawik
jî da wê û wê şand. Û Hacirê çû
çola Beer-Şeba, demekê li wan
dora geriya.
15 Û gava ava di meşkê de qe-
diya, lawê xwe avêt binya devi-
yekê. 16 Û nêzîkî tîr avêtinekê
bi dûr ket û bi gotina: Ez mirina
lawê xwe nebînim! rûnişt û li ber
wî qîr û qîr giriya.
17 Û Xwedê, dengê lawik bihîst.
Û milyaketê Xwedê, ji ezma-
nan ve bi gotina: Hacirê, çî yî te
heye? bangî wê kir: Metirse! Ji
ber ku Xwedê dengê lawik bihîst.
18 Rabe, lawê xwe rake, bi des-
tê wî ve bigire. Ji ber ku ez ê wî
bikim neteweyek mezin.
19 Û Xwedê, çavên Hacirê vekir
û Hacirê bîrekê dît. Û çû, meşkê
xwe dagirt û bi lawê xwe ve da
vexwarin.
20 Û gava lawik mezin dibû,
Xwedê bi wî re bû. Û lawik li çolê
jiya û bû tîrvan. 21 Û gava li çola
Paranê dijiya, diya wî jinek Misirî
ji wî re anî.

*Peymana di navbera Birahîm û Abîmelek de*

1.Mûs 26

22 Û di wê navberê de Abîmelek
û fermandarê artêşa wî Fîkol, ji
Birahîm re gotin: Di her kirinên
te de, Xwedê bi te re ye. 23 Û
niha, bona wê li ber Xwedê sondê
bixwe ku, tuyê neheqiyê bi min,
lawê min û zazê min ve neke! Bi
min û vî welatê ku tu bi mêvanî lê
dijî, mîna dilovaniya ku min ji te
re kiribû, bi qenciyê bike.
24 Û Birahîm got: Ez sondê dix-
wim!
25 Û Birahîm, ji Abîmelek re, gi-
liyê zilamên Abîmelek yên ku bi
zorê dest dane ser bîrekê kir. 26 Û
Abîmelek, bersiva: Ez nizanim ku
kî vêya kiriye da. Û: Te jî ji min
re ne got, ev cara yekemîne ku ez
dibihîzim!
27 Û Birahîm, dewar û gayan
girt û da Abîmelek. Bi vî awayî,
her duyan jî peymanekê çê kirin.
28 Û Birahîm, ji keriya xwe heft
berxikê mê cuda kir. 29 Û Abîme-
lek, ji Birahîm re got: Mana vêya
çî ye, çima te van heft berxikên mê
cuda kirin? 30 Û Birahîm, bersi-
va: Divê tu van heft berxên mê ji
destê min bigire da wî. Bila bibe
şahdeyiya ku min bîrê vekiriye!
31 Bo vê yekê, navê Beer-Şeba[1]
dan wir. Ji ber ku, her duyan jî li
wir sondê xwaribûn.
32 Paşî vê peymana ku li Beer-
Şeba hate çêkirin, Abîmelek û
tevî fermandarê artêşa xwe Fîkol,
vegeriyan herêma Filistê. 33 Û
Birahîm, li Beer-Şebayê darge-
zêkî danî û li wir bangî navê XU-
DAN Xwedayê bêdawî kir. 34 Û
Birahîm demekî dirêj li herêma

1 Beer-Şeva: Bîra Peymanê.

Filistê, bi mêvanî jiyana xwe do-
mand.

*Ceribandina Birahîm*
Îbr 11,17-19; Cihû 2,21-23

22 Û piştî van tiştan, Xwe-
dê Birahîm ceriband û bi
gotina: Birahîm! bang kir. Û Bi-
rahîm got: Ez li vir im! 2 Û Xwe-
dê got: Bi Îshaq, lawê xwe yî te-
kane yê ku tu jê hez dikî bigire û
here herêma Moriyayê. Û: Li wir,
li ser çiyayekê ku ez ê nîşanî te
bidim, lawê xwe mîna qewlekî
şewitandinê pêşkêş bike.
3 Û Birahîm, sibehê zû rabû û
cilikê li kerê xwe xist. Û ji xu-
lamên xwe du kesî û lawê xwe
Îshaq girt cem xwe. Û bona qew-
la şewitandinê êzingan qelişand û
ber bi cîhê ku Xwedê ji wî re dabû
nîşan kirin derket rê.
4 Birahîm di roja sêwemîn de, ji
dûr ve çavê xwe bilind kir, cîhê
ku dê biçe wir dît. 5 Û Birahîm ji
xulamên xwe re got: Hûn li vir, li
cem kerê bimînin. Lê belê ez ê bi
lawik re biçim li wê derê û sec-
de bikim[1] û vegerim cem we. 6 Û
Birahîm êzingên ku bona qewla
şewitandinê qelişandibû, li lawê
xwe Îshaq ve bar kir. Û wî jî agir û
kêrê rahişt. 7 Û gava pev re diçûn,
Îshaq ji bavê xwe Birahîm re got:
Bavo! Û Birahîm, bersiva: Ez li
vir im, lawê min! da. Û Îshaq, bi
gotina: A vay, êzing û agir li vir in,
lê belê berxika qewla şewitandinê
li ku ye? ji wî pirsî. 8 Û Birahîm
got: Lawê min, dê Xwedê bi xwe
berxika qewla şewitandinê peyde
bike. Û her du, meşa xwe ya bi
pev re ye domandin.
9 Û gava Birahîm, gîhaşt cîhê ku
Xwedê nîşan dabû, pêşkêşîgehekê
ava kir û êzingan li ser rêz kir. Û
lawê xwe Îshaq girê da û li ser
êzingên ku di pêşkêşîgehê de ne
dirêj kir. 10 Û Birahîm bona ku
wî serjêbike, dirêj bû û kêrê rahişt.
11 Lê belê milyaketê XUDAN ji
ezmanan ve bi gotina: Birahîm!
Birahîm! bangî wî kir.
Û Birahîm bi gotina: A vay, ez li
vir im! bersivê da.
12 Û milyaket got: Dest nede la-
wik û qet tiştekî bi wî neke; ji ber
niha fêhm kirim ku tu ji Xwedê
ve ditirsî, te lawê xwe yê tekane ji
min ve neparast!
13 Û gava Birahîm li dora xwe
nihêrt, a vay, beranek ku bi qi-
loçên xwe ve di nava keleman de
hatiye girtin, dît. Û Birahîm çû û
beran anî. Û li dêvla lawê xwe, wê
bi qewla şewitandinê ve pêşkêş
kir. 14 Û Birahîm navê: XUDAN-
Yîre[2] da wir. Bo vê yekê, gotina:
Dê li çiyayê XUDAN ve bê peyde
kirin heta îro tê gotin.

1 An jî: Peristinê bikim.

2 XUDAN-Yîre: XUDAN peyde dike.

15 Û milyaketê XUDAN, cara
duwemîn ji ezmanan ve bangî Bi-
rahîm kir û got: 16 XUDAN dibêje
ku; ez bi navê xwe sondê dixwim.
Ji ber ku te vêya kir û lawê xwe ji
min ve neparast, 17 ez ê bi zêdeyî
te pîroz bikim û ez ê nîjada te, qasî
sitêrkên li ezman in û qasî qûmên
qeraxa behrê zêde bikim. Dê nîja-
da te, bajarên neyarên xwe ji xwe
re bikin milk. 18 Û dê bi navdîtiya
te, hemû neteweyên rûyê erdê bên
pîroz kirin. Ji ber ku te soza min
guhdarî kir.
19 Û Birahîm vegeriya cem xu-
lamên xwe û pev re derketin rê
û çûn Beer-Şeba. Û Birahîm li
Beer-Şeba ve ma.

*Lawên Naxor*

1.Mûs 24,15; M.Sil 25,25

20 Û piştî van tiştan, nûçe ji Bi-
rahîm re hat. Ji wî re gotin: A
vay, Mîlka ji birayê te Nahor re
law anîn dinê. 21 Lawê wî yê
yekemîn Ûs û birayê wî Bûz û
Kemûêlê bavê Aram 22 û Kesed
û Hazo û Pîldaş û Yîdlaf û Betûêl.
23 Û Betûêl bû bavê Rebeka. Van
heyşt lawikan, Mîlka ji Nahorê
birayê Birahîm re anî dinê. 24 Û
cariya wî, ya ku bi navê Rêyûma
jî ji Nahor re, Tebah û Gaham û
Tahaş û Maaka anî dinê.

*Mirina Sarayê*

1.Mûs 25,7-10; 49,29-32

23 Û Sara, sed û bîst û heft
sal jiyanê borand; temena
Sara ewqas bû.
2 Û Sara li welatê Kenanê, li
Kîryat-Arbayê, cîhê ku îro jê re
dibêjin Hebron mir. Û Birahîm
hate ku bona Sara şînê bikişînî û
bigirî. 3 Û Birahîm ji ber miriyê[1]
xwe ve rabû û ji lawên Het re got:
4 Ez di nava we de biyan û mêvan
im. Erdekî ku ez ji xwe re bikim
goristan bifiroşin min. Ez miriyê
xwe rakim û binerd bikim!
5 Û lawên Het bi vî awayî bersivê
dan Birahîm, ji wî re gotin: 6 Ya
efendiyê me, li me guhdarî bike!
Tu di nava me de begekî xwurt î.
Miriyê xwe, li goristana me yî herî
qenc ve veşêre. Bona ku tu miriyê
xwe binerd bikî, kes goristana xwe
ji te nahêvişîne[2]. 7 Û Birahîm, li
ber lawên Het yên ku ji gelê welat
in xwar bû û got: 8 Ger hûn dixwa-
zin ku ez miriya xwe binerd bikim,
bona min, rica ji Efronê lawê So-
har re bikin; 9 bila şikefta Maqpe-
la ya ku di binya zeviya wî de ye
bifiroşe min. Ger heqê wir çi be, ez
ê di hizûra we de bêkêmasî bidim
û wir bikim goristan!
10 Û Efron jî di nava lawê Het de
rûniştî bû. Mîna ku hemû Hîtitiyên

---

1 Miriyê jina xwe, yanê jina Birahîm, Sara.

2 Kes goristana xwe ji te texsîr nake, an jî: Venaşêre (nade alî).

ku li ber deriyê bajêr ve civiyane
bibihîzin ji Birahîm re got: 11 Na
efendiyê min, guh bide min! Ez,
tevî şikeftê, zeviyê jî didim te.
Di hizûra gelê xwe de, wê jî di-
dim te. Miriyê xwe binerd bike!
12 Û Birahîm li ber gelê welat ve
xwar bû. 13 Û mîna ku her kes bi-
bihîze, ji Efron re got: Ji kerema
xwe, min guhdarî bike! Ez perê
zeviyê bidim. Qebûl bike ku, ez
miriyê xwe li wir binerd bikim.
14 Û Efron, bi gotina: Efendiyê
min, min guhdarî bike bersivê da.
15 Ma di nava min û te de qala
çar sed şekel[1] zîvî dibe? Miriyê
xwe binerd bike. 16 Û Birahîm
pêşniyara Efron qebûl kir û çar
sed şekelê ku Efron li ber lawên
Het qala wan kiribû li gor pîvana
giraniya bazirganan wezinand.
17 Bi vî awayî, zeviya Efron ya
li Maqpela ya nêzîkî Mamrê, tevî
hemû darên li dora wê û şikefta
di hundirê wê de ye, 18 di hizûra
lawên Het ku li ber deriyê bajêr
ve civiyane, bi milkê Birahîm ve
hatin qebûl kirin.
19 Û piştî wê Birahîm, jina xwe
Sara, li Mamrê ya li welatê Ke-
nanê, yanê li şikefta zeviya Maq-
pela ya ku nêzîkî Hebronê ye,
binerd kir. 20 Û lawên Het, ze-
viyê tevî şikefta di hundirê wê de
ye, bi cîhê goristana Birahîm ve
tesdîq kirin.

*Îshaq û Rebeka*

24 Û Birahîm mezin bû û zehf
pîr bûbû. Û XUDAN ji her
alî ve wî pîroz kiribû. 2 Û Birahîm
ji xizmetkarê di mala xwe de yê
herî kalepîr û berpirsiyarê her tiştî
ye re got: Destê xwe deyne bin
hêta min[2]. 3 Ez dixwazim, tu bi
navê XUDANê ku Xwedayê erd
û ezman e sondê bixwe. Tuyê ji
Kenaniyên ku ez di nava wan de
dijîm, bona lawê min jinekê ney-
ne. 4 Lê bona ku qîzekê ji lawê
min Îshaq re bistîne, tuyê here
welatê min û cem merivên min.
5 Û xizmetkar, bi gotina: Belkê
qîz nexwaze ku bi min re were
vî welatî? ji wî pirsî. Wê gavê, ez
lawê te bibim welatê ku tu ji wê
hatibû?
6 Û Birahîm got: Qet lawê min
nebe wir! 7 Dê XUDAN, Xwe-
dayê ezmanan yê ku min ji mala
bav ve, ji welatê ku ez lê bûyîme
aniye û bi gotina: Ez ê van erdana
bidim nîjada te! sondê xwariye, di
pêşiya te de milyaketê xwe bişîne.
Bi vî awayî, tuyê bikaribî bona
lawê min, ji wir qîzekê bistîne. 8 Û
ger keçik nexwaze ku bi te re were,
sonda ku te daye, têkiliyê bi te re

1 Çar sed şekel: Nêzîkî 4.5 kîlo.
2 Ev tevgera dide xuya kirin ku, dê bi biryarî sond bê cîh.

nîne. Lê lawê min nebe wir! 9 Û li
ser vêya, xizmetkar destê xwe danî
binya hêta efendiyê xwe Birahîm û
di vê babetê de sondê xwar.
10 Û xizmetkar, ji efendiyê xwe
deh heb deve stend û bi pertalên[1]
herî qenc ve derket rê; çû Aram-
Naharayîmê[2], bajarê ku Nahor lê
dijî. 11 Û devên xwe li ber bîrika
derveyî bajêr ve mexeland. Ber
êvarê bû, wexta derketina pîrekan
ya bona av stendinê bû.
12 Û xizmetkar; bi gotina: Ya
XUDAN, Xwedayê efendiyê min
Birahîm! ez li ber te digerim, îro
min serfiraz bike dua kir. Qenciyê
bi efendiyê min Birahîm re bike!
13 A vay, ez li ber çavkaniyê se-
kinîme. Û qîzên bajêr, bona avê
bistînin tên. 14 Û ez ê ji yekê re:
Ji kerema xwe şerbikê xwe dey-
ne, ez hinek avê vexwim bibêjim.
Ew jî, ger: Tu vexwe û ez jî avê
bidim devên te bibêje, ez ê biza-
nibim ku ew qîzika, qîza ku te
bona qûlê xwe Îshaq ve bijartiye
ye. Bi vî awayî, ez ê fêhm bikim
ku, te dilovaniyê bi efendiyê min
re kiriye!
15 Û berî ku ew duaya xwe biqe-
dîne, a vay, Rebekaya qîza Bêtûêlê
lawê Nahorê birayê Birahîm û
pîreka wî Mîlka ye, li ser milan bi
şerbikê avê ve derket. 16 Û keçi-
kek zehf xweşik bû. Hîn destê zila-
mekî li wê neketibû. Û çû çavkani-
yê, şerbikê xwe dagirt û vegeriya.
17 Û xizmetkar, bona pêşwaziya
wê baz da û got: Ji kerema xwe
ji şerbikê xwe hinekî avê bide, ez
vexwim.
18 Û wê got: Vexwe efendiyê
min. Û hema şerbikê xwe daxist û
bona ku vexwe, dirêjî wî kir.
19 Û paşî ku avê da wî got: Ez bona
devên te jî avê bikişînim. Bila heta
ku têr bibin vexwin! 20 Û bi lezî
avê li avdanka heywanan ve vala
kir û dîsa bona kişandina avê baz
da çû bîrê. Û bona hemûya devên
wî avê kişand. 21 Û zilam, bona
ku fêhm bike ka XUDAN rêya wî
vekiriye, an jî venekiriye, qîzikê
temaşe dikir.
22 Û paşî devan jî avê vexwarin
zilam, di giraniya bekayekê[3] de
xelika pozan û du bazinên ku di
giraniya deh şekelî[4] de ne derxist.
23 Û wî got: Ji kerema xwe bibêje,
tu qîza kî yî? Ma li mala bavê te,
cîhekî em şevê lê biborînin heye?
24 Û wê ji wî re got: Ez qîza
Bêtûêl im, yê ku lawê Mîlka û
Nahor e. 25 Û ji wî re got: Li cem
me ka û êm zêde ne, cîhê ku hûn
şevê lê biborînin jî heye.
26 Û zilam bi erdê ve xwar bû û ji
XUDAN re peristinê kir. 27 Bila

1 Alavên.
2 Yanê çû Mezrabotan.
3 Bekayek nêzîkî 6 gramî.
4 Deh şekel: Nêzîkî 110 gramî.

pesnahî ji XUDAN, Xwedayê
efendiyê min Birahîm re be! got.
Qenciya xwe û dilsoziya xwe ji
efendiyê min ve veneşart. Rêya
ku diçe mala merivên efendiyê
min, nîşanî min da!
28 Û qîzik baz da mala diya xwe
û tiştên ku bûne têgîhand. 29 Û
birayek Rebeka, bi navê Laban
hebû. Û Laban derket derve, re-
viya çû kaniyê cem zilam. 30 Û
xelika di pozê xwuşka xwe de,
bazinên di piyê wê de ne dît. Û
gava Rebeka, tiştên ku zilam jê
re gotine têgîhand, Laban çû cem
zilam. Zilam li serê kaniyê li cem
devan sekinîbû. 31 Û Laban got:
Keremî malê bike, ya zilamê ku
XUDAN wî pîroz kiriye! Çima
tu li derve sekiniyî? Ji ber ku min
bona te ode û bona devên te jî cîh
amade kirine!
32 Û bi vî awayî, zilam ket xanî.
Û wî (Laban) navtengên devan
vekir, êm û ka da wan. Û bona zi-
lam û yên li cem wî ne lingên xwe
bişon, avê anî. 33 Û wî xwarinê
danî ber, lê zilam got: Heta ku ez
sedema hatina xwe nebêjim, ez
xwarinê naxwim!
Û wî bersiva: Wê gavê bibêje! da.
34 Û zilam got: Ez xizmetkarê
Birahîm im. 35 Û XUDAN heta
ku tu bibêjî, efendiyê min pîroz
kir. Û wî dewlemend kir. Û dewar
û ga û zêr û zîv û kole û cariye û
deve û keran dan wî.
36 Û jina efendiyê min Sara, di
temena xwe ya borîn de lawekî ji
efendiyê min re anî dinê. Û wî her
tiştê ku lê xwediye, da wî[1]. 37 Û
efendiyê min, bi gotina: Tuyê ji
qîzên Kenaniyên ku ez li welatê
wan dijîm, pîrekê ji lawê min re
neyne. 38 Lê bona ku tu ji lawê
min re jinê bîne, tuyê biçe welatê
min, cem merivên min sondê bi
min ve da vexwarin!
39 Û ji efendiyê xwe re gotim:
Dibe ku keçik bi min re hatinê
nexwaze!
40 Û efendiyê min got: XUDANê
ku ez di rêya wî de dimeşim, dê
milyaketê xwe, bi te re bişîne; dê
rêya te veke. Û tuyê ji cem meri-
vên min, ji tifika bavê min, bona
lawê min qîzekê bîne. 41 Tuyê ji
sonda ku te daye min, gava tu bi-
gihêje cem merivên min û ger ew
qîzê nedin te, tûyê azad bibe.
42 Û îro, gava ez hatim serê ka-
niyê û bi vî awayî dua kirim: Ya
XUDAN, Xwedayê efendiyê min
Birahîm; ez li ber te digerim rêya
min veke! 43 A vay, ez li serê ka-
niyê disekinim. Û ez ê ji qîzên ku
werin avê bistînin re bibêjim: Ji
kerema xwe, ji şerbikê xwe hinek
avê bide ku ez vexwim, bibêjim!
44 Û ger ew jî: Tu vexwe û ez ê
bona devên te jî bikişînim bibêje,
ez ê zanibim ku qîza ku XUDAN

1 Yanê da Îshaq.

bona lawê efendiyê min bijartiye
ew e. 45 Hîn min di dilê xwe de
dua dikir, a vay, Rebeka li ser milê
wê şerbikê avê, derket derve. Û çû
serê kaniyê û avê stend. Û ji wê
re gotim: Hinek avê bide ez vex-
wim! 46 Û wê hema[1] şerbikê xwe
ji ser milên xwe daxist û got: Wex-
ve efendiyê min. Û ez avê bidim
devên te jî. Û vexwarim. Wê avê
da deveyan jî. 47 Û ji wê pirsîm û
gotim: Tu qîza kî yî? Û wê got: Ez
qîza Bêtûêlê lawê Nahor im; ya
ku Mîlka ji wî re aniye dinê. Û li
ser vêya, xelikê xistim pozê wê û
bazinan jî xistim destên wê. 48 Û
xwar bûm û peristinê ji XUDAN
re kirim. Û pesnahiyan pêşkêşî ji
XUDAN Xwedayê efendiyê xwe
Birahîm re kirim, ji ber ku bona
ez zazê birayê wî ji lawê efendiyê
xwe re bistînim, rêya rast nîşanî
min da. 49 Û niha, hûn ê qencî û
dilsoziyê nîşanî efendiyê min bi-
din, ya na hûn ê bibêjin nabe, ji
min re bibêjin. Ûsa ku, ez jî qirarê
bidim û ka hela ez ê çi bikim.
50 Û Laban û Bêtûêl, bersiva: Ev
karê XUDAN e danê. Em ne di-
karin ji te re bibêjin qenc e, ne jî
dikarin bibêjin xerab e. 51 A vay,
Rebeka li vir e. Bigre û bibe. Û
mîna ku XUDAN têgîhandiye,
bila ji lawê efendiyê te re bibe jin.
52 Û gava xizmetkarê Birahîm
van gotinana bihîst, bi erdê ve
secde kir û bi XUDAN ve peristî.
53 Û xizmetkar bona Rebeka, ta-
ximên zêr û zîv, kincan, bona bira
û diya wê jî, pertalên bi qîmet der-
xist û da wan. 54 Û tevî kesên li
cem wî ne xwar, vexwar û şevê jî
li wir borandin. Û sibehê rabûn û
xizmetkarê Birahîm got: Min bi rê
bikin, ez vegerim efendiyê xwe!
55 Û dayik û birayê Rebeka; ber-
siva bi vî awayî: Bihêle, bila qîzik
qasî deh rojî li cem me bimîne,
tuyê dawiyê here, dane wî.
56 Lê wî ji wan re got: Madem ku
XUDAN rêya min vekir, min bi
derengî ve nexin. Destûrê bidin,
ez vegerim efendiyê xwe! 57 Û
gotin: Em bangî keçikê bikin û ji
wê bipirsin. 58 Û bangî Rebeka
kirin û pirsa: Ma tu dixwazî bi vî
zilamî re biçî? ji wê pirsîn. Û wê
got: Ez dixwazim, biçim! 59 Bi vî
awayî, bona bi rê kirina Rebeka
û pîrika wê, xizmetkarê Birahîm
û zilamên wî derketin. 60 Û bi vî
awayî jî Rebeka pîroz kirin: Ya
xwuşka me, bibe dayika heza-
ran, deh hezaran û bila nîjada te,
welatên neyaran ji xwe re bikin
milk!
61 Û Rebeka û xizmetkarên wê
yên ciwan amade bûn û li deve-
yan siwar bûn û li pêy xizmetkarê
Birahîm ve ketin. Û xizmetkar
Rebeka girt û ji wir cuda bû. 62 Û
Îshaq ji Beer-Lahay-Roî ve hatibû.

1 Wê lez kir, an jî: Bilez.

Ji ber ku li herêma Negevê dijiya.
63 Û Îshaq ber êvarê, bona ku dua
bike, çû nav zeviyan. Û gava serê
xwe hilda û dît ku deve nêzîkî wî
tên. 64 Û Rebeka gava Îshaq dît, ji
devê daket. 65 Û ji xizmetkar re,
pirsa: Ev zilamê ku ji zeviyê, bona
pêşywaziya me tê kî ye? pirsî. Û
xizmetkar jî bi gotina: Efendiyê
min e, bersivê da. Û Rebeka pêçika
xwe rahişt û wecê xwe nuxumand.
66 Û xizmetkar, hemû kirinên xwe
ji Îshaq re got. 67 Û Îshaq, Rebeka
bir çadira diya xwe Sara û bi wê re
zewicî. Û bi vî awayî, Rebeka bû
jina wî. Û Îshaq ji wê hez kir. Û
paşî mirina diya xwe, Îshaq bi wê
ve xemrevîniyê[1] dît.

*Mirina Birahîm*

25 Û Birahîm bi pîrekek din
re zewicî. Û navê pîrekê
Ketûra bû. 2 Û ji wê zarokên wî,
yên ku navê wan Zîmran û Yokşan
û Medan û Midyan û Yîşbak û
Şûah çêbûn. 3 Û ji Yokşan jî Şeba
û Dedan bûn. Ji nîjada Dedan,
Asûriyan û Letûşiyan û Leûmi-
yan bûn. 4 Lawên Midyan, bi
navê Eyfa û Efer û Henox û Avîda
û Eldaa bûn. Vana hemûyan ji
nîjada Ketûra bûn. 5 Û Birahîm
her tiştên ku lê xwediye, ji Îshaq re
hişt. 6 Birahîm xelatan da zarokên
cariyên xwe. Û gava ew hîn dijiya,
van zarokana ji lawê xwe Îshaq
ve dûr xist û şand rojhilatê. 7 Û
Birahîm sed û heftê û pênc sal
jiyanê borand. Temenê wî ewqas
bû. 8 Û Birahîm bi pîr bûyî û mezin
bûyî û bi jiyanê ve têr bûyî hilma
xwe ya dawîn da. Mir û gîhaşt gelê
xwe. 9 Û lawên wî Îshaq û Simayîl
wî li şikefta Maqpela, ya di zeviya
Efronê lawê Soharê Hîtitî de ye
û nêzîkî Mamrê ye binax kirin.
10 Birahîm wê zeviya ji lawên Het
stendibû. Bi vî awayî, Birahîm
û jina wî Sara li wir hatin binerd
kirin. 11 Û Xwedê paşî mirina
Birahîm, lawê wî Îshaq pîroz kir.
Û Îshaq li Beer-Lahay-Roî ve
jiyana xwe didomand.

*Lawên Simayîl*

1.Dîr 1,3-31; 1.Mûs 17,20; 21,17-18

12 Û nîjadên Simayîl, yê ku Ha-
cirê ya Misirî ya ku cariya Sara
bû ji Birahîm re anî dinê; 13 li
gor bûyîna wan, navê lawên Si-
mayîl ev bûn: Lawê Simayîl yê
pêşîn Nebayot û Kedar û Adbeel
û Mîbsam û 14 Mîşma û Dûma
û Massa û 15 Hedad û Teyma û
Yetûr û Nafîş û Kedema. 16 Ev
donzdeh begên ku lawên Simayîl
bûn, bapîrên eşîrên xwe bûn. Van
navan dan gund û eşîrên xwe jî.
17 Û paşî Simayîl sed û sîh û heft
sal jiya, hilma xwe ya dawîn da.
Mir û gîhaşt gelê xwe. 18 Û gava
Lawên Simayîl diçûn Asûrê, li

1 Teselî.

nêzîka sînorê Misirê, li herêma ku
di nava Havîla û Şûrê de ye bicîh
bûn. Li rojhilata cîhê ku birayên
wan dijiyan bi cîh bûbûn.

*Aqûp û Esav*

Rom 9,10-13

19 Û nîjadên Îshaqê lawê Birahîm
ev in: 20 Û gava Îshaq bi Rebeka-
ya qîza Bêtûêlê Paddan-Aramî û
xwuşka Labanê Aramî re zewicî,
çel salî bû. 21 Û Îshaq bona jina
xwe lava ji XUDAN re kir. Ji ber
ku jina wî stewr bû. Û XUDAN,
bersiva lavaya Îshaq da û Rebeka
ducanî ma. 22 Û zarok di zikê wê
de dilîstin. Û wê, bi gotina: Ma çî
ye ev yê ku hate serê min? Û çû ku
bi XUDAN ve bişêwire. 23 Û XU-
DAN bi vî awayî bersivê da wê:
Di rehma te de du netewe hene, dê
ji te du gelê cuda bibin û dê yek ji
yê din xurttir bibe û dê yê mezin
xizmetê ji yê biçûk re bike.
24 Û gava wexta zayînê hat, a
vay, cotek lawên Rebeka bûn.
25 Û lawê wê, yê ku pêşiyê bû
sor û bi mû bû; cubekek sor di
bîr dianî. Navê Esav[1] li wî kirin.
26 Û dawiyê birayê wî bû. Û bi
destê xwe bi pahniya Esav ve di-
girt. Û bo vê yekê navê Aqûp[2] li
wî kirin. Û gava ew welidîn, Îs-
haq şêst salî bû.

*Esav mafê lawê yekemîniyê difroşe*

Îbr 12,16-17

27 Û Zarok mezin bûn. Û Esav bû
nêçîrvanek hoste yê ku ji beyaran
hez dike. Lê Aqûp jî zilamek bi
aram, yê tim li çadira xwe rûdine
bûbû. 28 Û Îshaq ji Esav hez dikir,
ji ber ku goştê nêçîrê, yên ku wî
dianî dixwar. Lê Rebeka jî ji Aqûp
hez dikir. 29 Û rojekê gava Aqûp
şorbê dikeland, Esav ji çolê hat.
Û birçî û westiya bû. 30 Û Esav ji
Aqûp re got: Ji kerema xwe ji vê
şorba gewez, ji ya gewez hinekî
bide ku ez vexwim! Ji ber ku ez bir-
çî û westayî me. Bo vê yekê, navê
Edom[3] jî li wî kirin. 31 Û Aqûp got:
Pêşiyê tu mafê lawê yekemîniyê
bide min! 32 Û Esav got: Binêre,
ez ji birçîna ve dikim bimirim. Û:
Ma çi fêda mafê lawê yekemîni-
yê li min heye? 33 Û Aqûp got:
Pêşiyê sondê bide! Û Esav bi sond
xwarinê, mafê lawê yekemîniyê
firot Aqûp. 34 Û Aqûp, nan û şorba
nîskê da Esav. Û wî xwar û vexwar
û rabû û çû. Bi vî awayî Esav, mafê
lawê yekemîniyê biçûk dît.

*Îshaq û Abîmelek*

26 Û xeynî xelaya ku dema
Birahîm dijiya, li welêt de
xelayek din bû. Û Îshaq çû Gêrarê,
cem Abîmelekê qiralê Filistê. 2 Û

1 Esav: Bi mû, bi pirç.

2 Aqûp: Bi pahniyê ve digire an jî fenek.

3 Edom: Gewez (sor).

XUDAN bi Îshaq ve xuyanî bû
û got: Neçe Misirê! Li welatê ku
ez ê ji te re bibêjim bi cîh bibe.
3 Demekê li wir bimîne. Ez ê bi te
re bim û te pîroz bikim; ji ber ku
ez ê hemûya van axan bidim te û
nîjada te. Û soza ku bi sond xwa-
rinê dabûm bavê te Birahîm, ez ê
bînim cîh. 4 Û ez ê nîjada te mîna
sitêrkên li ezmanin zêde bikim. Û
hemûya van netewana bidim nîja-
da te û dê hemûya neteweyên li
rûyê erdê ne, bi navdîtiya nîjada
te ve bên pîroz kirin. 5 Ji ber ku
Birahîm soza min guhdarî kir. Û
dilsozî li îkazên min, emirên min
û qaîdeyên min kir.
6 Bi vî awayî, Îshaq li Gêrarê ma.
7 Û dema gelên herêmê, di der-
heqê jina wî de pirsan pirsiyan:
Xwuşka min e, got. Ji ber, ditir-
siya ku bibêje: Jina min e. Difikirî
û digot: Ji bona Rebeka, gelên
herêmê dikarin min bikujin. Ji ber
ku Rebeka xweşik bû.
8 Û Îshaq, demek dirêj li wir ma.
Rojekê gava qiralê Filistê Abî-
melek, ji şivakê li derve dinêriya,
dît ku Îshaq jina xwe Rebeka di-
firkîne. 9 Û Abîmelek bangî Îshaq
kir got: Binêre, ev pîreka di rasti-
yê de jina te ye! Û: Çima te got
xwuşka min e?
Û Îshaq got: Ji ber, ez fikirîm ku
ez ê bona wê nemirim.
10 Û Abîmelek got: Çî ye ev ki-
rina te ya ku tu ji me re kir? Hin-
dik mabû ku yek ji gel, bi jina te
re raketa! Û te yê bi me sûc bida
kirin. 11 Û Abîmelek, bi gotinên:
Her kî ku destê xwe li vî zilama
an jî li jina wî bixe, dê bi biryarî
bê kuştin emir da hemûya gel.

*Filistiyan li dijî Îshaq radibin*

Zeb 112,1-3

12 Û Îshaq li wî welatî zevi-
yê çand û wê salê, sed qat zêde
zadên xwe çinand. Û XUDAN wî
pîroz kir. 13 Û ev mirov (Îshaq)
gîhaşt zêdeyiyê. Û hebûna wî her
ku diçû zêde dibû. Zehf dewle-
mend bû. 14 Bû xwediyê bi keri-
yan dewar û ga û pirr xulaman. Û
Filistiyan çavnebariyê li wî kirin.
15 Û hemû bîrên ku gava bavê wî
Birahîm dijiya, ji aliyê xulamên
wî ve hatibûn kolandin, Filistiyan
bi axê ve tijî kirin û girtin.
16 Û Abîmelek ji Îshaq re got: Ji
cem me here! Ji ber ku hêza te, ji
hêza me derbas kir. 17 Û Îshaq ji
wir cuda bû. Û li newala Gêrarê
ve çadirê danî û li wir bi cîh bû.
18 Û Îshaq bîrên, di rojên bavê wî
Birahîm dijiya de hatibûn kolan-
din, dîsa vekir. Ji ber ku Filistiyan,
paşî mirina Birahîm wan bîrikna
girtibûn. Û wî yek navî, navê ku
bavê wî dabû bîrikan da.
19 Û gava koleyên Îshaq di ne-
walê de bîrê dikolan, li wê derê
çavkaniyek zindî dîtin. 20 Û
şivanên Gêrarê, bi gotina: Av ya

me ye! bi şivanên Îshaq ve ketin
şer û pevçûnê. Îshaq, ji ber ku
bi wî re ketibûn keftûleftê, navê
Esekê[1] da bîrê.
21 Û wan bîrekî din jî kolan. Ji
bo vê bîrê jî şer derket û wî navê
Sîtna[2] li vê bîrê kir. 22 Û ji wir
cuda bû û li derekî din bîr kola. Û
ji ber vê bîrika şer derneket. Û bo
vê yekê, wî navê Rehobot[3] da wê.
XUDAN, ya herî dawîn aramiyê
da me! got. Û: Em ê li vî welatî bi
berdar bibin.
23 Û ew ji wir çû Beer-Şeba. 24 Û
wê şevê XUDAN bi wî re xuyanî
bû û got: Ez Xwedayê bavê te
Birahîm im; metirse! Ji ber ku ez
bi te re me. Ez ê te pîroz bikim
û bona xatirê qûlê xwe Birahîm,
nîjada te zêde bikim.
25 Û wî li wir pêşkêşîgehekê çê-
kir û bangî navê XUDAN kir. Û
çadira xwe li wir danî. Û koleyên
Îshaq jî li wir bîrekê kolan.
26 Wê gavê Abîmelek, tevî
şêwirdarê xwe Ahûzzat û fer-
mandarê artêşa xwe Fîkol, ji
Gêrarê çû cem Îshaq. 27 Û Îshaq
ji wan re got: Çima hûn hatin
cem min? Hûn ji min dikerihin.
Di ser de, we min ji welatê xwe
ve qewirandin.
28 Û bi gotina: Me bi eşkeretî
dîtin ku XUDAN bi te re ye ber-
sivê dan wî. Bo vê yekê, bila niha
di nava me de bibe sond. 29 Çawa
ku me dest neda te û her tim bi
qencî kirinê te di nava dilxweşiyê
de şandibin, tu jî xerabiyê bi me
neke. Em di vê babetê de bi te re
li hev bikin. Tu niha, zilamek ku
ji aliyê XUDAN ve hatiye pîroz
kirin î.
30 Û wî dawetekê da wan, xwarin
û vexwarin. 31 Û sibehê zû rabûn
û bi hev û din re sondê dan. Dawi-
yê Îshaq wan bi rê kir. Û di nava
dilxweşiyê de ji wir cuda bûn.
32 Û di eynî rojê de dîlên Îshaq
hatin û di derheqê bîra ku dikolin
de salixê dan wî. Me avê dîtin!
gotin. 33 Û wî navê Şîba[4] li bîrê
kir. Bo vê yekê bajar, heta îro bi
navê Beer-Şeba tê bîranîn.

*Esav bi du kecikên Hîtitî ve dizewice*

1.Mûs 27,46-28,9

34 Û Esav, di çel saliya xwe de bi
Yûdîta qîza Beerî yê Hîtitî û Ba-
semata qîza Elonê Hîtitî re zewicî.
35 Û ev pîrekana, li serê Îshaq û
Rebeka bûn derd û kul.

*Îshaq Aqûp pîroz dike*

27 Û gava ku Îshaq pîr bûbû
û çavên wî êdî nedidîtin;
bangî lawê xwe yê mezin Esav
kir û got: Lawê min!

---

1 Esek: Keftûleft.
2 Sîtna: Neyarî.
3 Rehovot: Aramî, firehî.
4 Şîba: Peyman.

Esav, bi gotina: Efendiyê min!
bersivê da.
2 Û wî got: Êdî ez pîr bûm; ez ni-
zanim ku ez ê kengê bimirim. 3 Û
niha çekên xwe, kewdana tîra xwe
û kevana xwe bigire, here beyaran
û bona min nêçîra heywanekî
bike. 4 Û ji bo min xwarinek bi
tahm, ya ku ez jê hez dikim çêbi-
ke û ji min re bîne ku ez bixwim û
berî ku bimirim, canê min te pîroz
bike.
5 Û gava Îshaq ji lawê xwe Esav
re axifiya, Rebeka li wan guhdarî
dikir. Û Esav, bona nêçîrê derket
çû beyaran. 6 Û Rebeka ji lawê
xwe Aqûp re ûsa got: Guhdarî
bike, min gotinên bavê te yên ku
ji birayê te Esav re digot bihîstin.
7 Bavê te ji wî re: Ji min re nêçîra
heywanekî bike û bîne got. Xwa-
rinek bi tahm çêke, ez bixwim.
Berî ku ez bimirim, te di hizûra
XUDAN de pîroz bikim. 8 Û niha
binêre lawê min, gotinên ku ez ê
ji te re bibêjim, baş guhdarî bike:
9 Niha here ji keriyê du karikên
bijartî bigire û ji min re bîne. Û ez
bi wan re, xwarineke bi tahm ya
ku bavê te jê hez dike, çê bikim.
10 Û tuyê bona ku bixwe, wê ji
bavê xwe re bibe. Ûsa ku, bila
berî mirina xwe te pîroz bike.
11 Û Aqûp ji diya xwe Rebeka
re got: A vay, bedena birayê min
Esav bi mû ye, lê belê ya min bê
mû ye; 12 dibe ku bavê min destê
xwe li min bixe? Û wê çaxê dê
fêhm bike ku ez wî dixapînim. Û
ez ê dêvla pîrozbûnê, naletê bi ser
xwe ve bînim!
13 Û diya wî got: Lawê min bila
naleta ku were te, bê ser min! Lê
tu min guhdarî bike here û ji min
re bîne!
14 Û ew çû û ji diya xwe re anî[1].
Û diya wî xwarinek bi tahm ya ku
bavê wî jê hez dike çêkir. 15 Û
kincên herî xweşik yên lawê wê
yî mezin Esav, wê gavê li malê
bûn. Û Rebeka, wan li lawê xwe
yî biçûk Aqûp kir. 16 Û ser destên
wî û cîhê bestûkura wî yên bê mû
jî bi çermê karikan ve girt[2]. 17 Û
xwarina xweş ya ku çêkiribû û
tevî nan da destê Aqûp.
18 Û ew gîhaşt cem bavê xwe û bi
gotina: Bavo! bangî wî kir. Bavê
wî: Belê, lawê min; tu kî yî? got.
19 Û Aqûp, ji bavê xwe re bi go-
tina: Ez lawê te yî yekemîn Esav
im, bersivê da; gotina te anîm cîh.
Ji kerema xwe rabe, rûne, goştê
nêçîrê ya ku anîme bixwe. Ûsa
ku, canê te min pîroz bike!
20 Û Îshaq ji lawê xwe re got: Te
çawa ûsa zû dît lawê min?
Û wî got: Ji ber ku Xwedayê te
XUDAN rastî min anî! 21 Û Îshaq
ji Aqûp re got: Nêzîk were, rica

1 An jî: Ji diya xwe re karikan anî.
2 Pêça.

dikim. Ez destê xwe bi te bidim,
hela bi rastî tu lawê min Esav î an
jî na, ez fêhm bikim!
22 Û Aqûp nêzîkî bavê xwe Îshaq
bû û wî destê xwe li wî xist û got:
Deng, dengê Aqûp e, lê belê dest
destê Esav in! 23 Û wî nas nekir.
Ji ber ku, destên wî, mîna destên
birayê wî Esav bi mû bûn û ew
pîroz kir. Gava Îshaq dê wî pîroz
bikira, 24 carekî din jî pirsî: Gelo
bi rastî jî tu lawê min Esav î? Û wî
got: Belê, ez im!
25 Îshaq got: Lawê min, goştê
nêçîrê bîne ku ez ji nêçîra lawê
xwe bixwim ku canê min te pîroz
bike. Û pêşiyê xwarinê, dawiyê
jî xemrê anî. Wî xwar û vexwar.
26 Û bavê wî Îshaq ji wî re got:
Nêzîk were û min ramûsîne, lawê
min! 27 Û nêzîk çû û wî ramû-
sand û ji kincên wî bêhn kir, wî
pîroz kir û ûsa got:
A vay, bêhna lawê min wekî bêh-
na beyarên ku XUDAN pîroz[1] ki-
riye ne.
28 Û bila Xwedê ji xunava
ezmanan û ji zeviyên bi berdar
yên rûyê erdê ve gellekî genim û
xemra teze bide te!
29 Bila gel qûlitiyê ji te re bikin û
netewe ji te re hustî xwar bikin! Ji
birayên xwe re bibe serwer û bila
lawên dayika te ji te re hustî xwar
bikin! Bila nalet li kesên ku naletê
li te bikin bibe û yên ku te pîroz
dikin, bila bên pîroz kirin!

*Esav Mafê Pîrozbûyînê winda dike*
Îbr 12,16-17

30 Û paşî Îshaq Aqûp pîroz kir,
Aqûp ji cem bavê xwe cuda bû.
Çawa ku ew çûneçû, birayê wî
Esav jî ji nêçîrê vegeriya. 31 Û wî
jî xwarinek bi tahm çêkir û ji bavê
xwe re bir. Û ji bavê xwe re got:
Bavo, rabe û goştê nêçîra lawê
xwe bixwe! Ûsa ku, canê te min
pîroz bike! 32 Û bavê wî Îshaq
pirsa: Tu kî yî? pirsî. Û wî, bi go-
tina: Ez lawê te yê yekemîn, Esav
im bersivê da.
33 Û lerizînek mezin bi Îshaq ve
girt. Û bi kilbûn û lerizînê; pirsa:
Wê çaxê yê ku nêçîrê kiribû û
xwarinê ji min re anîbû, kî bû?
pirsî. Û: Berî ku tu werî, xwarina
xwe xwarim û wî pîroz kirim. Û
êdî ew bû pîroz kirî!
34 Esav, gava gotinên bavê xwe
bihîst, bi dilşewatî zahftir qêriya
û ji bavê xwe re got: Min jî pîroz
bike bavo, min jî! 35 Û wî got:
Birayê te hat û min xapand û
pîroziya[2] te stend! 36 Û wî got:
Ma belasedem ji wî re dibêjin
Aqûp? Ji ber ku ev du car e min
dixapîne. Pêşiyê mafê minî lawê

---

1 An jî: Bereket, bibereket.
2 Bereketa te stend; an jî: Li dêvla te, ew hate pîroz kirin.

yekemîniyê stend. Û a vay, niha jî
ew li dêvla min hate pîroz kirin!
Û wî pirsa: Gelo te, bona pîroz
kirinê mafekî ji min re cuda ne-
kir? pirsî.
37 Û Îshaq bersivê da Esav û got:
A vay, min wî li ser te serwer danî
û: Hemû birayên wî dan xizme-
ta wî. Min wî bi genim û xemra
teze ve xwedî kir[1]. Ma ez dikarim
bona te çi bikim ku lawê min?
38 Û Esav ji bavê xwe re got:
Bavo, ma bi te re tenê bereketek
heye? Min jî pîroz bike bavo,
min jî![2] Û Esav bi dengê bilind
dest bi giriyê kir.
39 Û bavê wî Îshaq, bi vî awayî
bersivê da û ji wî re got: A vay,
xaniyê te ji xunava ezmanan û ji
axên dewlemend ve dûr bibe. 40 Û
tuyê bi şûrê xwe ve bijî û xizmetê
ji birayê xwe re bikî. Lê belê gava
ku tu serbest bigerî, tuyê nîrê wî ji
ser stuyê xwe ve bişkînî û bavêjî.

*Aqûp direve cem Laban*

M.Sil 18,19

41 Û ji ber ku bavê wî Aqûp pîroz
kiribû, Esav bi birayê xwe Aqûp
re ketibû girr û kînê. Û Esav di
dilê xwe de got: Çawa be, mirina
bavê min nêzîk bûye; wê gavê ez
ê birayê xwe Aqûp bikujim. 42 Û
ramanên lawê wê yî mezin Esav,
ji Rebeka re hate têgîhandin. Û
Rebeka bangî lawê xwe yî biçûk
Aqûp kir. Û ji wî re got: Binêre,
birayê te Esav kuştina te difikire û
bi vî awayî xwe teselî dike! 43 Û
niha min guhdarî bike lawê min.
Û hema rabe û bireve Haranê,
cem birayê min Laban. 44 Û heta
ku hêrsa birayê te aş bibe,, xeyda
ku ji te xeyîdiye derbas bibe û
tiştên ku te bi wî kirine ji bîr bike,
li wir bimîne. 45 Wê demê ez ê
yekî bişînim û te bînim. Ma çima
di rojekê de, ez bêyî we her duyan
bimînim?
46 Û Rebeka ji Îshaq re got: Ez
ji ber van qîzên Het, ji canê xwe
aciz bûm. Ger Aqûp jî bi qîzên vî
welatî, bi qîzên Het re bizewice,
ez ê çawa bijîm?

*Aqûp diçe Paddan-Aramê*

28 Û Îshaq bangî Aqûp kir
û wî pîroz kir, emir da wî
û jê re got: Bi qîzên Kenanî re
nezewice. 2 Hema here Paddan-
Aramê, mala Bêtûêlê bavê diya te
yî. Û li wir, bi qîzekî birayê diya
xwe Laban re bizewice. 3 Û bila
Xwedayê ku hêza wî têra her tiştî
ye, te pîroz bike û bi berdar deyne
û nîjada te zêde bike ku ji nîjada
te gelan biafirîne. 4 Û mîna ku Bi-
rahîm pîroz kiriye, bila te û nîjada
te jî pîroz bike. Ûsa ku bila van
erdên ku Xwedê daye Birahîm,

1 An jî: Gîhandim, têr kirim.

2 Ma tu dikarî tenê kesekî pîroz bikî?

van erdên ku tu bi biyanî li ser
wan dijî, bila bibin yên te! 5 Û
Îshaq bi vî awayî Aqûp bi rê kir.
Û Aqûp, bona ku biçe Paddan-
Aramê, cem Labanê lawê Bêtûêlê
Aramî û birayê Rebeka ya diya wî
û birayê wî Esav e, derket rê.
6 Û Esav dît ku, Îshaq Aqûp pîroz
kiriye û bona ku bizewice şand
Paddan-Aramê. Û wekî din hîn bû
ku bavê wî, gava Aqûp pîroz kiri-
ye; emrê: Bi qîzên Kenanî re ne-
zewice, daye wî û 7 Aqûp jî dayik
û bavê xwe guhdarî kiriye û çûye
Paddan-Aramê. 8 Û bi vî awayî
fêhm kir ku bavê wî ji qîzên Kenanî
ve hez nake. 9 Û çû cem Simayîl
û bi Mahalata xwuşka Nebayot û
qîza Simayîlê lawê Birahîm re ze-
wicî û wê anî ser jinên xwe.

*Xewna Aqûp*

10 Û Aqûp ji Beer-Şeba ve cuda
bû û ber bi Haranê ve derket rê.
11 Û gîhaşt derekê û li wir ma
şevînê, ji ber ku roj çûbû ava. Û
kevirek ji kevirên li wir rahişt û
xist bin serê xwe û raket. 12 Û
di xewna xwe de dît ku, a vay,
pêlikek li ser erdê sekiniye û serê
wê digihêje ezmanan. Û binêre,
milyaketên Xwedê ji pêlikên der-
diketin û dadiketin. 13 Û a vay,
XUDAN li ber serê wî sekinî û
got: Xwedayê bapîrê te Birahîm
û Îshaq XUDAN ez im. Ez ê van
erdên ku tu li ser raketiye bidim te
û nîjada te. 14 Û tuyê bibe xwe-
diyê nîjadek qasî toza rûyê erdê
bêhejmar. Û hûn ê ber bi rojhilat
û rojava û bakur û başûr ve belav
bibin. Û dê hemûya gelên li rûyê
erdê, bi navdîtiya te û nîjada te ve
bên pîroz kirin. 15 Û a vay, ez bi
te re me û li her cîhê ku tu here
ez ê te biparêzim û vegerînim van
erdan. Ji ber, heta soza ku dame te
bînim cîh, ez ê ji te veneqetim!
16 Û gava Aqûp hişyar bû, bi go-
tina: Bi rastî XUDAN li vir e, lê
belê hayê min jê tunebû! fikirî.
17 Û tirsiya û got: Çiqas cîhek
tirsehêz e! Ev der nabe ku xeynî
mala Xwedê, cîhek din be. Û ev
der deriyê ezmana ne!
18 Û Aqûp sibehê zû rabû û kevirê
ku xistibû bin seriyê xwe hilgirt û
ew mîna abîdeyekê çikand û rûnê
zeytê li ser wê rijand. 19 Û navê
Beytelê[1] da wir. Lê belê navê ba-
jêr yê berê Lûz bû.
20 Û Aqûp qewlekê danî û ûsa
got: Ger Xwedê bi min re bibe, di
rêya ku ez herim de min biparêze
û xwarin û kincan ji min re peyda
bike 21 û ez di nava dilxweşiyê de
vegerim mala bavê xwe, dê XU-
DAN bibe Xwedayê min. 22 Û ev
kevirê ku min bi abîdeyî çikandi-
ye, dê bibe mala Xwedê. Û ez ê
dehekê her tiştên ku tu bide min,
mutleqa bidim te!

1 Beytel: Mala Xwedê.

*Aqûp digihêje Paddan-Aramê*

29 Û Aqûp rêya xwe domand
û çû welatê gelên rojhilatê.
2 Û di çolê de bîrekê dît. Û li ber
bîrê sê keriyê mîhan mexel ha-
tibûn. Ji ber ku ji wê bîrê, avê di-
dan keriyan. Û kevirek mezin di
devê bîrê de bû. 3 Û gava hemû
keriyan li wir diciviyan û wan ke-
virê ku di devê bîrê de yî digindi-
randin û paşî ku avdana dewarên
xwe dikirin û kevirê dîsa datanîn
cîhê wê, devê bîrikê.
4 Û Aqûp pirsa: Birano, hûn ji ku
derê ne? ji şivanan ve pirsî. Û wan
jî, bersiva: Em ji Haranê ne dan.
5 Û pirsa: Gelo hûn Labanê ku
zazê Nahor e dinasin? ji wan re
pirsî. Û wan gotin: Em dinasin.
6 Û wî pirsa: Gelo qenc e? ji wan
pirsî. Û wan got: Qenc e. A vay,
qîza wî Rahêl tevî mîhan tê!
7 Û wî got: Hîn ji êvarê re pirr
heye, ne wexta civandina keriya
ye. Avdana dewarên xwe bikin,
bibin biçêrînin! 8 Û wan gotin:
Heta ku hemû kerî necivin û kevir
ji ber devê bîrê ve neyê gindirîn,
em nikarin bikin; wê gavê em ê
avdana mihan bikin.
9 Û gava hîn bi wan re diaxifî,
Rahêl tevî mîhên bavê xwe hat.
Ji ber ku Rahêl şivantiyê dikir.
10 Û gava Aqûp, Rahêla qîza
xalê xwe Laban û mîhan dît, çû û
kevirê devê bîrê gindirand û avê
da dewarên xalê xwe. 11 Û Aqûp
Rahêl ramûsand û qîr û qîr giriya.
12 Û Aqûp ji Rahêl re merivanti-
ya ji aliyê bav û lawitiya xwe ya
Rebeka got. Rahêl jî bi bazdan
çû û nûçeyê gîhand bavê xwe.
13 Û Laban, gava bihîst ku lawê
xwuşka[1] wî Aqûp hatiye, bona
pêşwaziya wî bike baz da. Wî
himbêz kir, ramûsand û anî mala
xwe. Û wî hemû tiştên ku bûne, ji
Laban re got. 14 Û Laban ji wî re
got: Tu xwîn û canê min î! Û ew
mehekî li cem wî ma.

*Aqûp bi Lêa û Rahêl ve dizewice*

Hoş 12,13

15 Û Laban got: Ma ji ber ku tu
merivê min î, tuyê bê heqdest li
cem min bixebitî? Ji min re bi-
bêje: Tu çiqasî heqdestê xwe di-
xwazî?
16 Û du qîzên Laban hebûn. Navê
ya mezin Lêa û ya biçûk jî Rahêl
bû. 17 Û çavên Lêa bi cazibe bûn[2],
lê Rahêl jî qîzikek xweşik û be-
jin li cîh bû. 18 Û Aqûp evîndarê
Rahêlê bû û got: Ez ê bona qîza
teyî biçûk Rahêl, heft salî xizmetê
ji te re bikim! 19 Û Laban got: Ez
bidim te, ji dayîna yekî din qenctir
e. Li cem min bimîne. 20 Û Aqûp
bona Rahêl heft sal xebitî. Ji ber
ku ji wê hez dikir, heft sal ji wî re

1 Xwarziyê wî.

2 Bi cazibe bûn, an jî: Lawaz bûn.

mîna çend rojan hat. 21 Û Aqûp ji
Laban re got: Dem gîhaşt, ka qîza
xwe bide, ez bizewicim!
22 Û Laban; hemû gelê herêmê
civand û daweteke danî. 23 Û
êvarê qîza xwe Lêa ji Aqûp re bir.
Û ew bi wê re raket. 24 Û Laban,
cariya xwe Zîlpa da xizmeta qîza
xwe Lêa. 25 Û gava bû sibeh, a
vay, ew Lêa bû! Û wî ji Laban re
got: Ev çî ye ku te bi min kir? Ma
ez bona Rahêlê, li cem te nexe-
bitîm? Û çima te min xapand?
26 Û Laban got: Li cem me adet
e. Heta ku qîza mezin bisekinî, ya
biçûk nayê zewicandin. 27 Tu vê
heftê biqedîne û em ê wê jî bidin
te. Lê tuyê bona wê, heft salê din
li cem min bixebite!
28 Û Aqûp qebûl kir. Hefteke bi
wê re buhurand. Û wî qîza xwe
Rahêl jî da wî. 29 Û Laban cari-
ya xwe Bîlha da xizmeta Rahêlê.
30 Û ew bi Rahêlê re jî raket. Û
ji Lêa zêdetir ji Rahêlê hez kir. Û
heft salên din jî xizmetê ji Laban
re kir.

*Lawên Aqûp*

Zeb 127,3; 1.Mûs 49,1

31 Û gava XUDAN dît ku Lêa
nayê hezkirin, malzaroka[1] wê
vekir. Lê belê Rahêl stewr bû.
32 Û Lêa ducanî ma û lawekî anî
dinê. Û navê wî Rûben danî. Ji
ber ku XUDAN bêmûdiya min
dît, got. Ji ber ku niha mêrê min ji
min hez bike!
33 Û dîsa ducanî bû û lawekî din
jî anî dinê. Û bi gotina: Ji ber,
XUDAN bihîst ku ez nayêm hez-
kirin, vî lawî da min û navê wî
Şîmeûn danî.
34 Û dîsa ducanî ma û lawekî
din anî dinê. Û got: Êdî dê mêrê
min bibe dilsozê min. Ji ber ku
min sê lawik ji wî re anîn dinê!
Bo vê yekê, navê Lêwî li lawik
kirin. 35 Û dîsa ducanî ma û la-
wekî din jî anî dinê. Û got: Ez ê
îcar pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikim! Bona wê navê Cihûda li
lawik kir. Û wê dev ji welidan-
dinê berda[1].

30 Û gava Rahêl dît ku nika-
re zarokan ji mêrê xwe re
bîne, çavnebariyê li xwuşka xwe
ve kir. Ji Aqûp re got: Zarokan
bide min! Û ya na ez ê bimirim.
2 Û Aqûp bi Rahêl ve hêrs bû û
bersiva: Xwedê dibe astengê xwe-
dî zarok bûna te. Ma ez Xwedê
me? da wê. 3 Û Rahêl got: A vay,
cariya min Bîlha; bi wê re rakeve,
da ku li ser çokê min de welidînê
bike ku, bila ji wê zarokên min he-
bin. 4 Û wê cariya xwe Bîlha, bi
jinitî da wî. Û Aqûp bi wê re raket.
5 Û Bîlha ducanî ma û lawekî ji

1 An jî: Rehîma wê.

2 An jî: Ji welidandinê hate birrîn.

Aqûp re anî. 6 Û Rahêl got: Xwe-
dê min bi heq derxist û: Hawara
min jî bihîst û lawekî da min! Bo
vê yekê navê Dan li wî kir. 7 Û
Bîlhaya cariya Rahêl dîsa ducanî
ma û lawek duwemîn ji Aqûp re
anî dinê. 8 Û Rahêl bi gotina: Min
li hemberê xwuşka xwe şerekî
mezin da û wê mexlûb kir! Û navê
Naftalî li lawik kir.
9 Û Lêa dît ku êdî nikare zarokan
çêke, cariya xwe Zîlpa girt û bi ji-
nitî da Aqûp. 10 Û cariya Lêa Zîl-
pa lawekî ji Aqûp re anî dinê. 11 Û
Lêa, bi gotina: Bioxir! û navê Gad
li wî kir. 12 Û Zîlpaya cariya Lêa,
lawek duwemîn ji Aqûp re anî
dinê. 13 Û Lêa got: Ez kêfxweş
im! Ji ber ku dê keçik ji min re
bibêjin: Kêfxweş! Û navê Aşer li
wî kir.
14 Û Rûben, di demsala çinandinê
de çû zeviyê. Û Li wir mandêrekê
dît û ji diya xwe Lêa re anî. Û
Rahêl ji Lêa re got: Ji kerema xwe
ji mandêreka ku lawê te aniye,
bide min jî. 15 Û wê jî bersiva:
Ma te mêrê min stendiye, ne bes
e? Di ser de tu mandêreka lawê
min jî dixwazî? da wê. Û Rahêl
got: Bila îsa be. Bila di berdêla
mandêreka lawê te de, îşev bi te
re rakeve. 16 Û êvarî, gava Aqûp
ji zeviyê vedigeriya û Lêa bona
pêşwaziya wî çû. Ji Aqûp re got:
Tuyê bi min re rakeve. Ji ber ku
tu di berdêla mandêreka lawê
min de, îşev yê min î. Û ew wê
şevê bi wê re raket. 17 Û Xwedê
dua Lêa bihîst. Û Lêa ducanî ma
û lawê xwe yê pêncemîn ji Aqûp
re anî dinê. 18 Û Lêa bi gotina: Ji
ber ku cariya xwe dam mêrê xwe,
XUDAN min bi xelat kir! Û navê
Îsşakar[1] li wî kir. 19 Û Lêa dîsa
ducanî ma û lawê xwe yê şeşemîn
ji Aqûp re anî dinê. 20 Û Lêa got:
Xwedê xelatek qenc da min. Êdî
dê mêrê min li cem min rûne. Ji
ber ku şeş law ji wî re anîm dinê!
Û navê Zebûlûn[2] da wî. 21 Û paşî
demekî din, wê qîzekê anî dinê û
navê Dîna lê kir.
22 Û Xwedê Rahêl di bîra xwe de
anî û bi bihîstina dua wê, malzaro-
ka[3] wê vekir. 23 Û Rahêl ducanî bû
û lawekî anî dinê. Û bi gotina: Xwe-
dê şermezariya min rakir! 24 Û bila
XUDAN lawekî din bi min de! navê
Ûsiv[4] li wî kir.

*Keriyên Aqûp zêde dibin*

5.Mûs 28,11

25 Û paşî Rahêl Ûsiv anî dinê,
Aqûp ji Laban re got: Min bişîne ez
herim mala xwe, erdên xwe! 26 Di
berdêla xizmeta min de jinên min,
zarokên min bide ku ez herim. Ji

1 Îsşakar: Xelat.
2 Zebûlûn: Qîmet.
3 Rehîma wê.
4 Ûsiv: Bila hîn jî zêde bidî.

ber, tu dizanî ku min çawa xizmetê
ji te re kiriye. 27 Û Laban ji wî re
got: Ger niha di çavê te de xêrê
dîtîbim, li vir bimîne! Ji ber, fêhm
kirim ku, XUDAN bi saya te min
pîroz kir. 28 Û wî got: Heqdestê te
çî ye, bibêje û ez bidim! 29 Û Aqûp
bi gotina: Tu dizanî ku min çawa
xizmetê ji te re kiriye û çawa li ke-
riyên te nihêrtime bersivê da wî.
30 Ji ber, berî ku ez werim, malên
te hindik bûn. Û bi hatina min XU-
DAN te pîroz kir. Û malê te her ku
çû, zêde bû. Û niha ez ê bona mala
xwe kengê bixebitim? 31 Û wî,
pirsa: Ez çi bidim te? ji wî pirsî. Û
Aqûp bersiva: Tiştekî nede min da,
ger tu vê pêşniyara min qebûl bikî,
ez ê dîsa keriyên te bajom, li keri-
yên te binêrim. 32 Ez îro li hemû
keriyên te binêrim; mîhên belek an
jî bi nuxtik, berxikên qer û bizinên
belek an jî bi nuxtik cuda bikim û
bila ev bibe heqdestê min. 33 Û
di demên pêşiyê de; ger tu were
û çavdêriyê li tiştên ku te dayiye
min bikî, tuyê bi hêsanî fêhm bikî
ku ka ez durist im an jî ne durist
im. Ger bizinên min yên bê nuxt
û belek tunebin û mîhên min yên
ne qer hebin, tê wê manê ku wan
ji te dizîme! 34 Û Laban got: Qe-
bûl, bila mîna gotina te be! 35 Û wê
rojê, nêriyên belek û bixet û hemû
bizinên belek û binuxt û hemûya
bizinên sipî û hemûya berxikên reş
cuda kir û da lawên xwe. 36 Û bi
rêyekî qasî sê rojî, ji Aqûp ve dûr
ket. Û Aqûp, ajotina keriyê Laban
yê ku mayîne domand.
37 Û Aqûp ji bo xwe, ji darê hew-
ran, bihîf û çinarê ve guliyên teze
jêkir. Û daran qeşart û kêrtikên
sipî di wan de vekir. 38 Û şivên ku
qeşartibû danî ber mîhan, avdanên
ku jê avê vedixwin. Û mîh, gava di-
hatin ku avê vexwin, hev ga didan[1].
39 Û gava kerî li ber şivan hev ga
didan, berxên bi xet, bi nuxtik û be-
lek ji wan çêdibûn. 40 Û Aqûp ber-
xikan cuda dikir û berê wan dizivi-
rand ber bi heywanên Laban yên bi
xet û qer. Û keriyên xwe cuda di-
girt û tevî yên Laban nedikir. 41 Û
gava heywanên xwurt yên di keriyê
de sor dibûn, Aqûp şivikan dida ber
çavên wan, dixist avdanan ku bila
li cem şivikan hev ga bidin. 42 Lê
şivikan danedida ber heywanên ke-
riyê, ên lawaz. Û bi vî awayî, La-
ban heywanên lawaz û Aqûp jî yên
xwurt girtin. 43 Û ew mirova, heta
ku bibêje dewlemend bû. Û bi pirr
hejmarî bû xwediyê kerî û cariye û
kole û deve û keran.

*Aqûp ji Laban direve*

1.Mûs 30,25-26

31 Û lawên Laban gotin:
Aqûp, her tiştên ku bavê

1 Baz didan ser hev, an jî: Radibûn ser hev, diçûn ba hev.

me li wan xwedî ne stend û:
Hemû hebûna xwe, ji tiştên ku
aidî bavê me ne qezenc kir! Û
gava Aqûp van tiştan bihîst, fêhm
kir ku, 2 nêrîna Laban ya ku li wî
dinêriya ne mîna berê ye.
3 Û XUDAN ji Aqûp re got: Ve-
gere axa bapîrên xwe û cem me-
rivên xwe! Û ez ê bi te re bim.
4 Û li ser vêya, Aqûp Rahêl û Lêa
bangî beyarên ku keriya wî lê ye
kir. 5 Û ji wan re got: Ez dinêrim
ku bavê we, mîna berê ji min re
nake. Lê belê Xwedayê bavê min,
bi min re ye. 6 Û hûn dizanin ku,
ez bi hemû hêza xwe, xizmetê ji
bavê we re dikirim. 7 Û bavê we,
min xapand, deh cara ya ku ez ê ji
wî bistînim guhert. Lê belê Xwe-
dê destûrê neda ku ew xerabiyê bi
min bike. 8 Gava wî: Bi heqdes-
tiya xwe, heywanên bi nuxt bigi-
re got, hemûya keriyê jî bi nuxt
zayîn. Û gava: Bi heqdestiya xwe,
yên bi xet bigire got, hemûya ke-
riyê jî bi xet zayîn. 9 Û Xwedê
heywanên bavê we stend û dan
min. 10 Û wusa bû ku, di dem-
sala cotbûna keriyan de çavê xwe
bilind kirim û di xewnê de dîtim.
Û a vay, nêriyên ku cot dibûn[1] bi
xet, bi nuxt û belek bûn. 11 Û di
xewna min de milyaketê Xwedê
bi gotina: Aqûp! bangî min kir. Û
gotim: Kerem bike! 12 Û ji min
re: Binêre, hemû nêriyên ku cot
dibin bi xet, bi nuxt û belek in,
got. Ji ber, min hemû kirinên ku
Laban bi te kir dîtin. 13 Ez Xwe-
dayê Beytelê me. Kanî te li wir
bona min abîdeyekê danîbû, bi
rûn ve pîroz kiribû û qewlan dabû
min. Niha rabe, ji vî welatî here û
vegere welatê ku tu jê bûyî. 14 Û
Rahêl û Lêa bersivê dan wî û jê
re gotin: Ma li mala bavê me, hîn
para me û mêrasa me heye? 15 Ma
em di çavên wî de êdî ne xerîb in?
Ji ber ku wî me firotin. Û hemûya
berdêla ku bona me hatibû dayîn
jî xwar. 16 Ji ber, hemû hebûna
ku Xwedê ji bavê me stendiye, yê
me û zarokên me ne. Û niha Xwe-
dê ji te re çi gotibe ûsa bike! 17 Û
bi vî awayî, Aqûp rabû û zarokên
xwe, tevî jinên xwe li deveyan
siwar kirin. 18 Û hemû heywa-
nan da pêşiya xwe; bi malên ku
dabû ber hev û tevî heywanên ku
li Paddan-Aramê qezenc kiribû,
bona ku here welatê Kenanê, cem
bavê xwe Îshaq, derket rê. 19 Û
Laban çû ku hiriyê mîhên xwe bi-
bire û Rahêl Terafîma[2] bavê xwe
dizî. 20 Û Aqûp jî bi negotina
reva xwe, Labanê Aramî xapand.
21 Û bi vî awayî, her tiştên ku aidî
xwe ye girt û reviya. Û rabû çemê
Feratê derbas bû û ber bi herêma
çiyayî ya Gîladê çû.

---

1 An jî: Nêriyên ku baz didan ser miyan.

2 Pûtê biçûk, yê ku mirov dikare bi xwe re bigerîne.

*Laban bi pey Aqûp dikeve*

22 Û roja sêwemîn, reva Aqûp
têgîhandin Laban. 23 Û wî birayên
xwe girt cem xwe û rêya heft roj bi
pêy Aqûp ve ket û di çiyayê Gîladê
de gîhaşt wî. 24 Û wê şevê Xwedê
ket xewna Labanê Aramî û ji wî re
got: Balkêş bibe! Ne tiştekî xerab
ne jî qenc ji Aqûp re nebêje! 25 Û
Laban gîhaşt Aqûp. Û Aqûp, çadi-
ra xwe li herêma çiyayiya Gîladê
ve danîbû. Û Laban jî, tevî birayên
xwe çadira xwe li herêma çiyayiya
Gîladê ve danî. 26 Û Laban ji Aqûp
re got: Çî ye ev kirina te? Te min
xapand. Û qîzên min rahişt û mîna
bindestên şer te wan bir. 27 Çima
tu bi dizîka reviya? Û çima te min
xapand? Û çima te ji min re negot?
Min ê te bi kêfxweşiyê û bi mur-
xan, bi tef û lîr ve bi rê bikira. 28 Û
te destûrê neda ku ez bi zaz û qîzên
xwe ve bi ramûsanê xatir ji wan
bixwazim. Te ehmeqiyê kir. 29 Ez
di quweta ku xerabiyê bi we bikim
de me, lê belê Xwedayê bavê we,
doh şev ji min re: Balkêş bibe! got.
Ne gotinek xerab ne jî qenc, tiştekî
ji Aqûp re nebêje! 30 Û ji ber ku te
zehf bêriya mala bavê xwe kiribû,
tu ji me veqetiya. Lê ma te çima
îlahên min dizî?
31 Û Aqûp, bi gotina: Ez tirsiyam,
bersivê da. Ji ber, ez ûsa fikirîm û
gotim ku, tuyê qîzên xwe bi zorê ji
destên min bistîne. 32 Ger tu îlahên
xwe bi kî re bibîne, ew ê bê kuştin.
Li cem birayên me, tu bi xwe bige-
re, di nava pertalên min de tu çiyî
aidî xwe bibînî, bigire. Lê Aqûp
nizanîbû ku Rahêl wan dizî bû.
33 Û Laban, li çadira Aqûp, Lêa
û her du cariyan nihêrt û ew nedît.
Û ji çadira Lêa derket û ket çadira
Rahêl. 34 Û Rahêl, Terafîma ku
dizî bû, xistibû cuhera deveyê xwe
û li ser rûniştibû. Û Laban, çawa
qul bi qul li çadirê geriyabe jî, lê
ew nedît. 35 Û wê ji bavê xwe re
got: Efendiyê min, ji ber ku ez li
ber te ranebûm nexeyîde. Ez bi bê-
desmêjiyê ketime. Û Laban li her
derê çadirê geriya, lê Terafîm ne-
dît. 36 Û Aqûp hêrs bû, bi Laban
re kete kefûleftê û bersiv da û ji
Laban re got: Ma sûcê min çî ye?
Çi gunehî kirim ku tu ûsa bi hêrs li
pêy min ketî? 37 Te li hemûya per-
talên min geriya, ma te tiştekî aidî
xwe yî dît? Ger hebe, wê deyne vir
ber birayên min û birayên xwe. Û
bila ew di derheqê me her duyan
de qirarê bidin! 38 Ez bîst sal li
cem te mam. Bizinên te û mîhên
te, qet berxikan ji ber neavêtin. Û
min ji nava keriyên te, yek berane-
kî nexwar. 39 Yên ku heywanên
hov perçe kirine rê te nedam; min
zirara te kişand. Te bi şev an jî bi
roj, berdêla her heywanên ku ha-
tiye dizîn ji min ve xwest. 40 Ez
di rewşekî ûsa de bûm ku; bi rojê
germî û bi şevê jî xunav min xwar
û qedandin û xew neket çavê min.

41 Ez bîst sal li mala te jiyam.
Bona her du qîzên te çardeh sal û
bona keriyê te şeş salî xizmetê ji
te re kirim. Û te deh cara mişeya[1]
min guhert! 42 Ger Xwedayê bavê
min û Xwedayê Birahîm û yê ku
Îshaq peristinê jê re dikir[2] ne li ali-
yê min ba, te yê niha min muheqeq
dest vala bişanda. Xwedê zoriya
ku kişandime û keda ku dayime dît
û doh şev te îkaz kir! 43 Û Laban
jî bersiva: Pîrek qîzên min û zarok
yên min û kerî keriyên min in da
wî û her tiştên ku tu li vir dibîne
aidî min in! Ma ez îroj dikarim çi
bi qîzên xwe an jî zarokên ku anî-
ne dinê bikim? 44 Û niha were, em
sond bixwin. Û em şahdeyan têxin
nav xwe!
45 Û Aqûp kevirekî rahişt û wî
mîna abîdeyekî danî. 46 Û Aqûp
ji birayên xwe re got: Keviran
bidin hev! Û wan kevirên ku da-
bûn hev, li derekê kom kirin. Û li
wir, li cem komê xwarinê xwarin.
47 Û Laban, navê Yegar-Sa-
hadûta[3], Aqûp jî navê Galed li ko-
mikê kirin. 48 Û Laban got: Bila
ev komika, îro di nav me de bibe
şahde. Bo vê yekê navê Galedê
dan komikê. 49 Û bi navê Mîşpa[4]
jî tê bîranîn. Ji ber ku wî got:
Gava em ji hev û din dûr bikevin,
bila XUDAN di nava me de çav-
nêriyê bike. 50 Ger tu bi xerabî ji
qîzê min re bikî û bi pîrekên din
re bizewicî, di nava me de mirov
tune; binêre, nava te û min de, dê
Xwedê şahde be. 51 Û Laban ji
Aqûp re got: A vay, komika ke-
viran û a vay, abîda ku danîme!
52 Bila ev komik û abîde her yek
bibin şahdeyek. Ez derbasî wî
aliyê komikê nabim û xerabiyê bi
te nakim. Û divê tu jî vê komika
û abîdê derbas nebe û xerabiyê
bi min ve neke. 53 Bila Xwe-
dayê Birahîm û Xwedayê Nahor
û Xwedayê bavê wî, di nava me
de bibe darazkir! Û Aqûp bi navê
yê[5] ku bavê wî Îshaq peristinê
jê re dike ve sondê xwar. 54 Û
Aqûp li çiya qurbanekî serjêkir û
birayên xwe dawetî xwarinê kir.
Û xwarinê xwarin û şevê li çiya
borandin.
55 Û Laban sibehê zû rabû û zaz û
qîzên xwe ramûsand û wan pîroz
kir û Laban vegeriya çû cîhê xwe.

32 Û gava Aqûp rêya xwe
didomand û milyaketên
Xwedê rastî wî hatin. 2 Û
çaxa Aqûp wan dît; bi gotina:
Artêşgeha Xwedê ev e û navê
Mahanayîm li wir kir.

1 Mûçe, an jî: Ucret.
2 Yê ku Îshaq peristinê jê re dikir: Bi Îbranîtî Yê ku Îshaq jê ditirsiya.
3 Bi Aramîtî, Yegar-Sahadûta û bi Îbranîtî Galed tên mana komale ya şahdeyiyê.
4 Mîşpa: Qûleya çavdêriyê.
5 Xwedayê ku bavê wî jê re peristinê dikir.

*Aqûp amadekariya pêrgîniya Esav dike*
3 Û Aqûp ji berê de nûçegîhanan
ji birayê xwe Esavê ku li erdên
Edom, di welatê Seîrê de dijiya
re şand.
4 Û wî emir da wan û got: Ji efen-
diyê min Esav re ûsa bibêjin: Qûlê
te Aqûp dibêje ku: Heta niha, ez
bi mêvanî li cem Laban mam.
5 Û ez bûm xwediyê ga û ker û
dewar û kole û cariyan. Û bona ku
ez efendiyê xwe dilxweş bikim, ji
pêşiyê nûçê ji wî re şandim. 6 Û
nûçegîhan vegeriyan û ji Aqûp re
gotin: Em çûn cem birayê te Esav.
Û ew jî: Bi çar sed zilamî, bona
pêşwaziya te tê.
7 Û Aqûp zehf tirsiya û xof girt. Û
gelê ku li cem wî bû û dewar û ga
û deveyan kir du kom. 8 Û wî bi
gotina: Ger Esav were û êrîşî ko-
maleyekê bike, qet nebe dê koma
din xelas bibe, fikirî. 9 Û Aqûp
got: Ya Xwedayê bapîrê min Bi-
rahîm û Xwedayê bavê min Îs-
haq XUDAN! Te ku soza: Vegere
welatê xwe û cem merivên xwe û
ez ê te serfiraz bikim! da min.
10 Ez ne liyaqî ewqas qencî û dil-
soziya ku tu nîşanî min didî me. Ji
ber ku gava ji çemê Urdunê derbas
dibûm, xeynî çoyê min tiştekî min
tune bû. Û niha ez bi du artêşî ve
vegeriyam! 11 Ez li ber te digerim,
min ji destê birayê min ji destê Esav
ve biparêze! Ji ber, ez ditirsim ku
dê ew were û êrîşî min, zarokan û
dayikên wan bike. 12 Û te soza: Bi
biryarî ez ê te serfiraz bikim û nîja-
da te jî qasî qûma behran ku nayê
jimartin zêde bikim dabû min!
13 Û wî wê şevê li wir borand. Û
ji heywanên ku bi xwe re anîbû,
bona birayê xwe Esav, bi xelatî
14 du sed bizin û bîst nêrî, du sed
mîh û bîst beran, 15 tevî çêlikên
wan sîh deveyên mê, çel çêlek û
deh ganêr û bîst kerên mê û deh
sîpe[1] cuda kirin. 16 Û wan mîna
keriyên cuda bi cuda da koleyên
xwe û got: Di pêşiya min de he-
rin û di nava keriyan de valahiyê
bihêlin. 17 Û emrekî ûsa da xu-
lamên yekemîn: Gava birayê min
Esav rastî te bê, ger pirsa: Xwe-
diyê te kî ye, tu diçe ku? Ev hey-
wanên ku li ber te ne, yên kî ne?
bipirse, 18 tuyê: Yên qûlê te Aqûp
in, bibêje: Ji efendiyê min Esav re
bi xelatî dişîne. A vay, ew bi xwe jî
li pêy me tê. 19 Û vî emrî da kolên
duwem û sêwem û heçiyên ku li
pêy keriyan diçin: Gava hûn Esav
bibînin, hûn ê eynî tiştî bibêjin!
20 Û hûnê: A vay, qûlê te Aqûp
jî li pêy me tê bibêjin. Ji ber bi
gotina: Ez ê bi xelata ku ji pêşiyê
ve dişînim wî nerm bikim û dawi-
yê rûyê wî bibînim. Dibe ku min
qebûl bike[2], difikiriya. 21 Û bi vî

1 Kerên nêr.
2 An jî: Dibe ku li min biborîne.

awayî xelatê ji pêşiyê ve şand û
şevê jî li cîhê ku qonax danîbû
borand.

*Aqûp Digemşe[1] û navek nû distîne*

Hoş 12,4-5

22 Û Aqûp wê şevê rabû, du jinên
xwe û du cariyên xwe û yanzdeh
lawên xwe girt cem xwe û ji reqa
çemê Yabûk ve derbasî aliyê din bû.
23 Û paşî wan derbas kir, her
tiştên ku li wan xwedî bû jî der-
bas kir. 24 Û bi vî awayî, Aqûp li
dawiyê tenê ma. Û zilamek heta
roj hilat bi wî re gulaşê kir.
25 Û gava fêhm kir ku nikare Aqûp
bi binî bixe, xwe li hestiyê hêta wî
xist. Û ûsa ku, gava gulaşê dikir,
hestiyê Aqûp yê hêta wî ji cîh der-
ket. 26 Û zilam got: Min berde, ji
ber ku roj gewr dibe! Û Aqûp bi
gotina: Heta ku tu min pîroz nekî,
ez te bernadim! bersivê da wî.
27 Û zilam, pirsa: Navê te çi ye?
ji wî pirsî. Û wî got: Aqûp.
28 Û wî got: Dê êdî ji te re nebêjin
Aqûp, dê bibêjin Îsraêl[2]. Ji ber ku
te bi Xwedê re, bi mirovan re şer
kir û qezenc kir. 29 Û Aqûp, pirsa:
Ji kerema xwe tu dikarî navê xwe
bibêje? pirsî. Û wî got: Ma çima
tu navê min dipirsî? Û wî, ew li
wê derê pîroz kir. 30 Û Aqûp; bi
gotina: Ji ber ku Xwedê rû bi rû
dîtim û canê min hate bexişandin!
navê Peniyel[3] da wir.
31 Û dema ew ji Peniyelê ve cuda
dibû, li ser wî ve roj hilat. Û ji
ber hêta xwe dukuliya. 32 Bo vê
yekê Îsraêliyan heta îro jî reha li
ser hestiya hêtê ye naxwin. Ji ber
ku li reha ser hestiyê hêta Aqûp ve
ketibû.

*Aqûp rastî Esav tê*

33 Û Aqûp nihêrt[4] û dît ku,
a vay, Esav bi çar sed
zilamên xwe ve tê. Û zarokên
xwe da Lêa û Rahêl û her du
cariyan. 2 Û cariyan û zarokên
wan li pêşiyê û Lêa û zarokên
wê li pêy wan û Rahêl û Ûsiv jî li
dawiya hemûyan rêz kir. 3 Û ew
derbasî pêşiya giştika bû. Û gava
nêzîkî birayê xwe dibû heft carî
bi erdê ve secde kir.
4 Û çi heye ku, Esav bi baz dan
hat û pêşwaziyê li wî kir û bi
himbêz kir û xwe avêt stuyê wî
û ramûsand. Û her du jî dest bi
giriyê kirin. 5 Û Esav li zarok û
pîrekan nihêrt û bi gotina: Vanê li
cem te ne kî ne? ji wî pirsî. Û wî
got: Zarokên ku Xwedê bi xêra
xwe daye qûlê te ne!
6 Û cariyan û zarokên cem wan
nêzîk bûn û xwar bûn. 7 Û Lêa
û tevî zarokên xwe jî hat û xwar

---

1 Gulaşê digre, gulaşê dike...
2 Îsraêl: Yê ku bi Xwedê ve gulaşê digre.
3 Peniyel: Wecê Xwedê.
4 Çavê xwe bilind kir.

bûn. Û ya dawîn jî Rahêl û Ûsiv
nêzîk hatin û xwar bûn. 8 Û Esav,
pirsa: Gelo mana civaka din, ya
ku ez rastî wê hatim çi bû? pirsî.
Û wî, bersiva: Bona ku ez di çavê
efendiyê xwe de dilovaniyê bibî-
nim da. 9 Û Esav got: Têra xwe
malên min hene, birayê min; bila
malê te ji te re bimîne!
10 Û Aqûp, bi gotina: Nabe; ger
ez di çavê te de dilovaniyê qezenc
kiribim, xelata min ji destê min ve
bistîne! bersivê da. Ji ber ku wecê
te, mîna dîtina wecê Xwedê dîtim.
Û te min qebûl kir. 11 Ji kerema
xwe, xelata ku ji te re şandime qe-
bûl bike. Ji ber Xwedê qenciyek
ûsa bi min re kir ku û her tiştê min
heye! Û heta ku xelata xwe da qe-
bûl kirin, di ber xwe de da.
12 Û Esav got: De, em rêya xwe
bidomînin û: Ez ê ji pêşiya te de
biçim! 13 Û wî (Aqûp) ji wî re
got: Efendiyê min, tu dizanî ku
zarok nazik in! Berxikên mîh û
gayên li cem min in, hene. Û ger
em bona rojekî din meşandinê
zorê bidin wan, dê hemûyên ke-
riyan bimirin. 14 Rica dikim,
efendiyê min, tu ji pêşiya qûlê
xwe ve here. Û ez ê gava xwe li
gor heywan û zarokan bavêjim û
hêdî hêdî werim. Li Seîrê, ez ê bi-
gihêjim efendiyê xwe!
15 Û Esav got: Ez ê ji zilamên li
cem min in çend hebî bidim cem
te. Û wî, bi gotina: Çima ev? pirsî.
Ji bona ku ez di çavê efendiyê xwe
de dilovaniyê bibînim! 16 Û Esav
wê rojê, bona ku vegere Seîrê, der-
ket rê. 17 Û Aqûp jî çû Sûkotê[1]. Û
li wir ji xwe re xanî û ji heywanan
re jî hêwiran ava kir. Bo vê yekê,
navê Sûkotê li wir kir.
18 Û gava Aqûp, ji Paddan-
Aramê hat, di nava ewlekariyê
de gîhaşt welatê Kenanê, bajarê
Şekemê. Û li nêzîka bajêr qona-
xa xwe danî. 19 Û perçeyê zeviya
ku çadira xwe lê danîbû, ji lawên
Hamorê ku bavê Şekem e, bi sed
parî zîvî[2] ve stend. 20 Û li wir
pêşkêşîgehekê ava kir û navê El-
Elohey-Îsraêl[3] da wir.

*Dîna û Şekemiyan*

34 Û Dînaya qîza Lêa, ya ku
wê ji Aqûp re anîbû, ro-
jekê bona serîdana qîzên herêmê
çû. 2 Şekemê lawê Hamorê Hîvî
yê ku begê wê herêmê bû, gava
Dîna dît, girt tev wê raket û qîzi-
kê xera kir. 3 Û dilê xwe da qîza
Aqûp Dîna. Û xort ji keçikê hez
kir û bi nazikî ji dilê wê re axifî.
4 Û Şekem ji bavê xwe Hamor re
got: Vê qîzikê, bona ku bibe jina
min ji min re bistîne!

1 Sûkot: Hêwiran.
2 Sed parî zîv: Bi Îbranîtî, sed kesîta.
3 El-Elohey-Îsraêl: Xwedê, Xwedayê Îsraêl.

5 Û gava Aqûp bihîst ku qîza
wî Dîna xera kirine û lawên wî
li beyaran, li ber heywanan bûn.
Aqûp, heta ku ew hatin neaxifî.
6 Û di vê navberê de Hamorê
bavê Şekem, bona axaftinê çû
cem Aqûp. 7 Û çawa lawên Aqûp
bûyerê bihîstin, ji beyarê ve vege-
riyan. Û ew mirovana kesirî bûn û
pirr bi hêrs bûn. Ji ber ku, Şekem
bi raketina qîza Aqûp re, ji Îsraêlê
tiştê ku kirêt bû kiribû. Û divê
tiştekî ûsa nebûba.
8 Û Hamor ji wan re got: Dilê
lawê min Şekem di qîza we de
ye. Ji kerema xwe, wê bi jinitî
bidin lawê min! 9 Û bibin meri-
vên me. Em qîzan bidin hev û ji
hev û din bistînin. 10 Û tevî me
bijîn! Û welat li ber we ye, hûn
li ku derê dixwazin, li wir bi cîh
bibin û danûstendinê bikin û bi-
bin xwedî milk! 11 Û Şekem jî ji
bav û birayên qîzikê re got: Ez ê
di çavê we de dilovaniyê bibînim!
Û hûn çi bixwazin, ez ê bidim we!
12 Hûn çiqas qelind dixwazin,
bixwazin, ez ê her tiştên ku hûn
dixwazin bidim; lê qîzikê bona ku
bibe jina min, bidin min!
13 Û ji ber ku xwuşka wan Dîna
hatibû xera kirin; lawên Aqûp,
bersivek xapînokî dan Şekem û
bavê wî Hamor. 14 Û ji wan re go-
tin: Nabe, em nikarin xwuşka xwe
bidin zilamek bê sunet. Dê bona
me bibe şermezarî. 15 Lê em ê bi
vî şertî qebûl bikin: Ger hemûya
zilamên we, mîna me sunet bibin;
16 wê demê em ê bikaribin qîza
bidin hev û din û ji hev û din qîza
bistînin. Em ê bikaribin bi we re
bijîn û bibin gelek. 17 Û ger hûn
qebûl nekin û sunet nebin, em ê
qîza xwe bigirin û herin!
18 Û ev pêşniyar, ji Hamor û lawê
wî Şekem re qenc hate xuyanî ki-
rin. 19 Û ew xortê ku di malbata
xwe de kesê herî birêz bû û li cîh
anîna vê pêşniyara dereng nema.
Ji ber ku bûbû evîndarê qîza
Aqûp.
20 Û Hamor û lawê wî Şekem,
bona ku rewşê ji gelê bajêr re bi-
bêjin, çûn cem deriyê bajêr û go-
tin: 21 Ev zilamana hevaltiyê rê
me didin. Bila li welatê me bijîn
û danûstendinê bikin. A vay, zevi-
yên me fireh in, besî wan jî dikin,
besî me jî. Em ê bikaribin qîzan
bidin hev û din û ji hev û din bis-
tînin! 22 Ew tenê bi vî şertî bi me
re yekbûyînê û jiyînê qebûl dikin:
Dixwazin zilamên me jî mîna
wan sunet bibin. 23 Bi vî awayî,
dê hemûya keriyên wan, malên
wan û heywanên wanî din bibin
yên me, ne ûsa ye? Werin, em bi
wan re li hev bikin, bila bi me re
bijîn! 24 Û hemû kesên ku ji de-
riyê bajêr ve derbas bûn, gotinên
Hamor û lawê wî Şekem qebûl
kirin û hemû zilamên di bajêr de
ne sunet bûn.

25 Û roja sêwemîn, hîn zilaman
êşa sunetê dikişandin, du kes ji
lawên Aqûp, Şîmeûn û Lêwiyê
birayên Dîna, şûrên xwe girtin
ser xwe û bêyî tirs kişandinê ke-
tin bajêr û hemûya zilaman ji şûr
ve derbas kirin. 26 Û Hamor û
lawê wî Şekem jî bi şûr ve kuştin.
Û Dîna ji mala Şekem rahiştin
û çûn. 27 Û hemû lawên Aqûp,
cesedan şelandin û bajar talan
kirin. Ji ber ku xwuşka wan xera
kiribûn. 28 Dewar û ker û gayên
li bajêr û beyaran e jî bi dest ve
xistin. 29 Û hemûya malên wan û
zarokên wan û pîrekên wan girtin
û hemû tiştên di mala wan de ne
talan kirin.
30 Û Aqûp ji Şîmeûn û Lêwî re
got: We Kenanî û Perîziyên li vî
welatî dijîn, kirin neyarê min, serê
min xistin belê. Û ez bi hejmarî
kêm im. Ger yek bibin û êrîşî min
bikin, ez ê tevî malbata xwe tune
bibim! 31 Û wan bi gotina: Ma
divê mîna fahîşeyekê ji xwuşka
me re bikirana? bersivê dan wî.

*Aqûp vedigere Beytelê*

1.Mûs 28,10-22

35 Û Xwedê ji Aqûp re got:
Here, li Beytelê bi cîh bibe.
Û: Ji Xwedayê ku gava tu ji bi-
rayê xwe Esav ve direviya, ji te re
xuyanî bû re, pêşkêşîgehekê li wir
amade bike!
2 Û Aqûp ji malbata xwe re û
ji hemûyên li cem wî ne re got:
Îlahên xwe yên biyan bavêjin!
Û: Xwe safî bikin û kincên xwe
buguherin! 3 Û em biçin Beytelê.
Û ez ê li wir, ji Xwedayê ku gava
tengasiyê dikişandim, qêrina min
bihîst û li her derê bi min re ye
re pêşkêşîgehekê ava bikim! 4 Û
bi vî awayî, her kes îlahên[1] xwe
yî biyan û guharên ku di guhên
xwe de ne dan Aqûp. Û Aqûp,
vana nêzîkî Şekemê di bin dar-
berûyekê de binax kir. 5 Û dawi-
yê koç kirin. Û gelên li bajarên
dorê dijîn, li pêy lawên Aqûp
neketin. Ji ber ku tirsa Xwedê bi
hemûya girtibû.
6 Û Aqûp tevî hemû gelê ku li cem
wî bû, hate Lûzê, – ev Beytel e –,
ya ku li welatê Kenanê bû. 7 Û li
wê derê pêşkêşîgehek ava kir û
navê El-Beytelê[2] da wir. Ji ber ku
gava ji ber birayê xwe direviya,
Xwedê li wir ji wî re xuyanî bûbû.
8 Û gava Deboraya pîrika Rebeka
mir, di bin darberûya ku li başûrê
Beytelê ye hate binax kirin. Bo
vê yekê navê Allon-Bakût[3] li dar
kirin.
9 Û gava Aqûp, ji Paddan-Aramê
vegeriya, Xwedê dîsa bi wî ve

1 Pûtên xwe yî biyan.
2 El-Beytel: Xwedayê Beytelê.
3 Allon-Bakût: Berû ya giriyê.

xuyanî bû û wî pîroz kir. 10 Û
Xwedê ji wî re got: Ji te re dibêjin
Aqûp, lê belê ji niha ve pêv dê navê
te ne Aqûp, lê belê dê bibe Îsraêl û
navê Îsraêl li wî kir. 11 Û Xwedê ji
wî re got: Ez Xwedayê ku hêza wî
têra her tiştî dike me. Bi berdar be
û zêde bibe! Dê ji te netewe û ko-
malek netewan bibe. Û dê ji nifşa
te ve qiralan derkevin. 12 Û erdên
ku dame Birahîm û Îshaq, ez ê bi-
dim te û li pêy te, ez ê bidim nîjada
te! 13 Û Xwedê ji Aqûp ve cuda
bû û ji cîhê ku bi wî re diaxifî, ber
bi jor ve hilkişî. 14 Û Aqûp, li cîhê
ku ew (Xwedê) bi wî re axifî, abî-
deyek kevirîn danî. Û li ser wê jî
pêşkêşiya rijandinê û zeytê rijand.
15 Û Aqûp navê Beytelê li wir, li
cîhê ku Xwedê pê re axifî kir.

*Mirina Rahêl û Îshaq*

16 Û ji Beytelê ve koç kirin. Û berî
ku bigihêjin Efratê û Rahêl weli-
dînê kir. Û gava welidînê kir, zehf
jan û êşan kişand. 17 Û gava Rahêl
janê dikişand, pîrika wê ji wê re
got: Metirse! Ji ber ku lawekî te yî
din dibe! 18 Lê belê Rahêl li ber
mirinê bû. Gava canê xwe dida,
navê Ben-Onî[1] li wî kir. Lê bavê
wî, navê Benyamîn[2] li wî kir.
19 Û Rahêl mir û li Efratê, yanê
li rêya Beytlêhemê hate binerd ki-
rin. 20 Û Aqûp, kevirekî danî ser
gora Rahêlê. Ev heta îro kevirê
tirba Rahêlê ye.
21 Û Îsraêl dîsa koç kir û ji qû-
leya Ederê wê de xonaxa xwe
danî. 22 Û dema Îsraêl li wê
herêmê dijiya, Rûben çû bi Bîl-
haya cariya bavê xwe ve raket.
Û Îsraêl vêya bihîst[3].
23 Û donzdeh lawên Aqûp hebûn.
Lawên Lêa: Rûben, lawê Aqûp yê
yekemîn û Şîmeûn û Lêwî û Cihû-
da û Îsşakar û Zebûlûn. 24 Lawên
Rahêl: Ûsiv û Benyamîn. 25 Û
lawên Bîlhaya ku cariya Rahêl
bû: Dan û Naftalî. 26 Û lawên
Zîlpaya ku cariya Lêa bû: Gad û
Aşer. Lawên Aqûp, yên ku li Pad-
dan-Aramê bûyîne, vana ne.
27 Û Aqûp çû cem bavê xwe Îs-
haq, çû Mamrê ya nêzîkî Kîryat-
Arba, ya ku îro jê re dibêjin Heb-
ron, cîhê ku Birahîm û Îshaq jî bi
biyanî lê mabûn. 28 Û Îshaq sed
û heyştê sal jiya. 29 Û Îshaq pîr
bûyî, bi jiyanê ve têr bûyî hilma
xwe ya dawîn da. Mir û gîhaşt
gelê xwe. Û lawên wî Esav û
Aqûp wî binerd kirin.

*Nîjada Esav*

5.Mûs 2,4-5

36 Û nîjada Esav vana bûn,
ev Edom e: 2 Esav bi van

1 Ben-Onî: Lawê qedera min.
2 Benyamîn: Lawê destê minî rast, an jî lawê başûrî.
3 Di Septûagînta de; gava vêya bihîst, zehf xeyidî, lê di Îbranîtî de jî bi gotina, vêya bihîst derbas dibe.

qîzên Kenanî ve zewicî: Adaya
qîza Eylonê Hîtitî; Oholîbamaya
qîza Ana û zaza Sîbonê Hîvî, 3 Û
Basemata qîza Simayîl û xwuşka
Nebayot. 4 Û Ada ji Esav re
Elîfaz anî û Basemat Rûel anî 5 û
Oholîbama jî Yeûş, Yalam û Ko-
rah anîn dinê. Lawên Esav, yên
ku li welatê Kenanê ve bûbûn,
vana ne.
6 Û Esav, jinên xwe û lawên xwe
û qîzên xwe û hemû zilamên li
mala wî ne û giştika heywanên
xwe û hemûya malên ku li welatê
Kenanê ve qezenc kiriye girt û ji
Birayê xwe Aqûp ve cihê bû, çû
welatekî din. 7 Ji ber, qasî ku pev
re nikaribin bijîn zêde malên wan
hebûn. Û ev axên ku bi biyanî lê
dijîn, têra, dewarên wan nediki-
rin. 8 Û Esav; yanê Edom, li Seîra
herêma çiyayî ve bi cîh bû.
9 Û nîjada Esavê bapîrê Edomiyan,
yên ku li Seîra herêma çiyayî ve
bi cîh bûne, ev in: 10 Navê lawên
Esav ev in: Ji jinên Esav, Elîfazê
lawê Ada û Rûeyê lawê Basemat.
11 Û lawên Elîfaz: Teman, Omar,
Sefo û Gatam û Kenaz. 12 Û
Tîmna, cariya Elîfazê lawê Esav
bû. Û Amalek ji Elîfaz re anî dinê.
Vana, zazên Adaya jina Esav in.
13 Û lawên Rûel vana bûn: Nahat
û Zerah, Şamma û Mîzza. Vana,
zazên Basemata jina Esav in.
14 Lawên ku Oholîbamaya jina
Esav, ya zaza Sîbon û qîza Ana,
anine ev in: Û ji Esav re Yeûş û
Yalam û Korah anî.
15 Begên eşîra lawên Esav ev in:
Lawên Elîfazê ku lawê yekemîn
yê Esav e: Teman beg, Omar beg,
Sefo beg, Kenaz beg, 16 Korah
beg, Gatam beg, Amalek beg.
Vana li welatê Edomê de, begên ji
nîjada Elîfaz bûn û zazên Ada bûn.
17 Û lawên Rûelê ku lawê Esav
e, ev in: Nahat beg, Zerah beg,
Şamma beg, Mîzza beg. Vana li
welatê Edomê, begên ji nîjada Rûel
bûn û zazên Besameta jina Esav
bûn. 18 Û lawên Oholîbamaya
jina Esav ev in: Yeûş beg, Yalam
beg, Korah beg. Vana begên ku ji
nîjada Oholîbamaya jina Esav û
qîza Ana ye, hatine bûn. 19 Vana
hemûyan lawên Esav, yanê Edom
in. Û vana begên wan bûn.

*Nîjada Seîr*

20 Lawên Seîrê Horî yê ku li welat
ve dijiyan ev in: Lotan û Şobal û
Sîvon û Ana û 21 Dîşon û Eser û
Dîşan. Lawên Seîr yên Horî, ên ku
li Edomê begitiyê dikirin vana bûn.
22 Û lawên Lotan: Horî û Heman.
Û Tîmnaya xwuşka Lotan bû.
23 Û lawên Şobal vana bûn: Alvan
û Manahat û Ebal, Şefo û Onam.
24 Û lawên Sîbon vana bûn: Ayya
û Ana. Ev, Ana yê ku gava li çolê,
kerên bavê xwe Sîbon dajot,
çavkaniyên ava germ dîtiye bû.
25 Zarokên Ana vana bûn: Dîşon

û Oholîbamaya qîza Ana. 26 Û
lawên Dîşon vana bûn: Hemdan û
Eşban û Îtran û Keran. 27 Lawên
Eser vana bûn: Bîlhan û Zaavan û
Akan. 28 Lawên Dîşan vana bûn:
Ûs û Aran. 29 Begên eşîran yên
Horî vana bûn: Lotan beg, Şobal
beg, Sîbon beg, Ana beg, 30 Dîşon
beg, Eser beg, Dîşan beg. Begên
eşîran yên Horî, yên ku li welatê
Seîrê ne, ev bûn.

*Qiralên Edomê*

31 Berî ku li Îsraêlê kesekî qira-
letî nekiriye, van qiralan rêvebi-
riya welatê Edomê kirin: 32 Be-
layê lawê Beor bû qiralê Edomê.
Û navê bajarê wî Dînhaba bû.
33 Gava Bela mir, Yobabê lawê
Zerahê Bosrayî bû qiral. 34 Dema
Yobab mir û li şûna wî Huşamê
Temanî bû qiral. 35 Gava Huşam
mir, Hadadê lawê Bedad yê ku
Midyan li beyarên Moab ve
lêxistibû[1] di şûna wî de bû qiral.
Navê bajarê wî Avît bû. 36 Dema
Hedad mir û li şûna wî Samlayê
Masrekî bû qiral. 37 Gava Samla
mir, li şûna wî Şaûlê li ber qera-
xa çem ji Rehovotî bû, bû qiral.
38 Gava Şaûl mir, li şûna wî Baal-
Hananê lawê Akbor bû qiral.
39 Û gava Baal-Hananê lawê Ak-
bor mir, Hadar li şûna wî bû qiral.
Û navê bajarê wî Paû bû. Û navê
jina wî, Mehatabêla qîza Matreda
qîza Mazahab bû.
40 Li gor eşîr û nîjadên wan,
navê begên ku ji nîjada Esav di-
hatin ev bûn: Tîmna beg, Alva
beg, Yetet beg, 41 Oholîbama
beg, Ela beg, Pînon beg, 42 Ke-
naz beg, Teman beg, Mîbsar beg,
43 Magdîel beg, Îram beg. Begên
Edomî, yên ku navê xwe dabûn
cîhê lê xwedî ne, yên li welatê ku
lê dijiyan, vana bûn.

*Xewnên Ûsiv*

37 Û Aqûp li welatê Kenanê,
ya ku bavê wî lê bi biyanî
maye de rûnişt.
2 Dîroka nîjada Aqûp ev e: Ûsiv
xortekî hivdeh salî bû. Tevî bi-
rayên xwe yên ku ji Zîlpa û Bîl-
haya jinên bavê wî bûne, keriyan
dajot. Û xerabiyên ku birayên wî
dikirin, digehand bavê xwe. Û
Ûsiv ciwan bû.
3 Û Îsraêl, ji lawên xwe yî din
zêdetir ji Ûsiv hez dikir. Ji ber ku
Ûsiv, di kalepîriya wî de bûbû. Û
kincekî dirêj û rengînî ji Ûsiv re
dabû çêkirinê. 4 Û gava birayên
Ûsiv dîtin ku bavê wan ji wan zê-
detir ji wî hez dike û ji wî nefret
kirin. Û êdî gotinek şêrîn ji wî re
nedigotin[2]. 5 Û Ûsiv xewnekî dît.
Gava vêya ji birayên xwe re got,
wan hê jî bi zêdeyî ji wî nefret ki-

1 Rastî xerakirinê biribû.

2 An jî: Êdî nedikaribûn ku silavê bidin wî.

rin. 6 Û wî ji wan re got: Ji kerema xwe, li xewna ku dîtime guhdarî bikin! 7 A vay, me li zeviyê demedan girê didan. Û a vay, nişka ve demeda min rabû û zîq sekinî. Û a vay, yên we jî civiyan û li dora wê xwar bûn. 8 Û birayên wî ji wî re gotin: Ma tuyê li serê me bibe qiral? Ma tuyê rêvebiriyê li me bikî? Û ji ber xewnên wî û gotinên wî ji wî ve bitûmî keribîn.

9 Û wî xewnek din dît û ji birayên xwe re got: Û a vay, xewnekî din dîtim. Û a vay, roj û heyv û yanzdeh sitêrk li ber min xwar bûn! 10 Û gava Ûsiv vê xewnê ji bav û birayên xwe re got; bavê wî bi wî re pekiya û ji wî re got: Ev çi xewn e? Ma yanê ez û diya te û birayên te werin û em ê li ber te xwar bibin? 11 Û birayên wî çavnebariyê li Ûsiv re dikirin; lê belê bavê wî ev gotina di dilê xwe de veşart.

*Birayên Ûsiv wî difroşin*

1.Mûs 45,4-8

12 Û birayên wî, bona ku keriya bavê xwe biçêrînin[1] çûn Şekemê. 13 Û Îsraêl ji Ûsiv re got: Ma birayên te li Şekemê keriyê najon? Were, ez te bişînim cem wan! Û wî bi gotina: Ez amade me! bersivê da. 14 Û ji wî re got: Here, li birayên xwe û li keriyê binêre. Hela her tişt di rêya xwe de ne an jî nîn in, salixê bigehîne min. Û bi vî awayî, wî ji newala Hebronê ve şand. Û ew gîhaşt Şekemê.

15 Û gava li beyarê digeriya, zilamekî wî dît û pirsa: Tu li çi digerî? ji wî pirsî.

16 Û wî bersiva: Ez li birayên xwe digerim da wî. Ew keriyên xwe li ku derê dajon; ji kerema xwe ji min re bêje! 17 Û zilam got: Ji vir cuda bûn. Ûsa bihîstim ku, gotin: Em herin Dotanê! Û bi vî awayî Ûsiv li pêy birayên xwe çû û li Dotanê wan dît. 18 Û birayên wî, ji dûr ve wî dîtin. Berî ku ew bigihêje cem wan, bona ku wî bikujin dek û dolab ava kirin. 19 Û ji hev û din re gotin: A vay, xwediyê xewnê tê! 20 Û niha werin û em wî bikujin û bavêjin bîrekê ji nav bîran. Û em ê bibêjin: Heywanekî bejî wî xwar. Û em binêrin, wê gavê dê xewnên wî çawa bibin!

21 Û Rûben vêya bihîst û ew ji destên wan ve xelas kir û got: Em qîmî canê wî nekin! 22 Û Rûben got: Xwînê nerijînin. Wî bavêjin vê bîrika tenha, lê belê dest li wî nedin. Armanca wî xelas kirina Ûsiv û ji bavê xwe re vegerandin bû. 23 Û gava Ûsiv gîhaşt cem wan, birayên wî kincê dirêj û rengînî ji pişta wî kişandin û girtin 24 û wî avêtin bîrek vala û bêav.

1 Bajon.

25 Û gava bona xwarina nan
rûniştin û çavê xwe bilind kirin,
dîtin ku a vay, ji aliyê Gîladê kar-
wanek Îsmaîlî tê. Û deveyên wan
bi mezeloqa darînî[1], bi ya ji darê
çamê[2] û bi belesanê ve barkirî
bûn. Û diçûn Misirê.
26 Û Cihûda ji birayên xwe re
got: Ma em birayê xwe bikujin û
xwîna wî veşêrin, em ê çi qezenc
bikin? 27 Werin û em wî bifiroşin
Îsmaîliyan. Û bi vî awayî, tê hisêb
ku em destê xwe li canê wî naxin.
Ji ber ku ew birayê me ye, goştê
me ye! Û birayên wî qebûl kirin.
28 Û bazirganên Midyanî ji wir
ve derbas dibûn û birayên wî Ûsiv
ji bîrê ve kişandin û bi bîst zîvî ve
firotin Îsmaîliyan. Û wan Ûsiv bi-
rin Misirê.
29 Û Rûbenê ku vegeriya bîrê û a
vay, Ûsiv di bîrê de tunebû û kin-
cê xwe çirand. 30 Û vegeriya cem
birayên xwe û got: Lawik ne li
wir e! Ma ez, ez ê biçim ku derê?
31 Û li ser vêya, nêriyek serjê ki-
rin û kincê Ûsiv yê dirêj û rengînî
di xwîna wî de dan. 32 Û wî kincê
dirêj ji bavê xwe re şandin û go-
tin: Me vêya dîtin. Hela binêre, ka
yê lawê te ye, an jî na?
33 Û wî kinc nas kir: Belê, viya
kincê lawê min e, got. Dibe ku hey-
wanek bejî wî xwaribe. Divê Ûsiv
mutleqa perçe bûyî ye! 34 Û ji kese-
ra xwe, Aqûp ser û berê xwe çirand
û pertalekî li pişta xwe ve pêçand û
bona lawê xwe, demekî dirêj şînê
kişand. 35 Û ger hemû law û qîzên
wî bona şa bûna wî xebitiyan jî, wî
şabûnê nexwest. Û bi gotina: Ez ê
bi şîn girtinê herim cem lawê xwe,
warê miriyan! Û giriyê xwe yî bona
lawê xwe domand.
36 Û Midyaniyan wî li Mi-
sirê firotin wezîfedarek Fîrawûn,
Potîfarê ku fermandarê komaleya
parazkiran bû.

*Cihûda û Tamar*

1.Dîr 2,3-4; Met 1,3

38 Û di wan deman de, Cihû-
da ji birayên xwe ve cihê
bû û çû cem zilamê ku navê wî
Hîra yê Adûlamî ye. 2 Û Cihûda li
wir, rastî qîzikekî mirovê Kenanî
bû. Û navê bavê qîzikê, Şûa bû.
Û Cihûda bi qîzikê re zewicî. 3 Û
ew ducanî ma û lawekî anî dinê.
Û Cihûda, navê Er li wî kir. 4 Û
pîrek dîsa ducanî ma û lawekî din
anî dinê. Û navê Onan li wî kir.
5 Û dîsa lawekî anî dinê. Û navê
Şela li wî kir. Û gava Şela hate
dinê, Cihûda li Kezîbê bû.
6 Û Cihûda, bona lawê xwe yî
yekemîn Er, jinekê anî. Û navê wê
Tamar bû. 7 Û Erê lawê yekemîn
yê Cihûda ye, di çavên XUDAN
de xerab bû. Û XUDAN wî kuşt.

---

1 Kître.

2 An jî: Qac, qaj.

8 Û Cihûda ji Onan re got: Bi jina
birayê xwe re bizewice. Ji ber ku tu
tiyê wê yî, berpirsiyariya xwe yî li
hemberê wê bîne cîh, ji birayê xwe
re nîjadê bighîne! 9 Lê belê Onan
dizanîbû ku, zarokên bibin dê ne
aidî wî bin. Bo vê sedemê, ger ken-
gê bi pîreka birayê xwe re radiket,
bona ku nîjadê ji birayê xwe re ne-
gihîne, avika xwe ya mêraniyê bi
erdê ve dirijand. 10 Û ev kirina wî
di çavên XUDAN de xerab bû. Û
bo vê yekê wî, ew jî kuşt.

11 Li ser vêya Cihûda, ji bûka xwe
Tamar re got: Vegere mala bavê
xwe! Heta ku lawê min Şela mezin
bibe, li wir bimîne û bi jinebiyitiyê
ve bijî. Ji ber wî, bi gotina: Dibe ku
Şela jî mîna birayên xwe bimire,
difikirî. Û bi vî awayî Tamar
vegeriya mala bavê xwe.

12 Paşî demekî dirêj, jina Cihûda
ya qîza Şûa mir. Û Cihûda paşî şîna
wî qediya, tevî hevalê xwe Hîrayê
Adûlamî çû Tîmna, cem kesên ku
birrîna hiriyê keriyê wî dikirin.

13 Û nûçeya: Xezûrê te bona hiri-
yê keriyên xwe bibirre, diçe Tîm-
na dan Tamarê. 14 Û wê kincên
jinebîtiyê ji xwe kir, pêçika xwe
pêçand û çû li deriyê Eynayîm yê
ku li ser rêya Tîmna ye rûnişt. Ji
ber, dîtibû ku Şela mezin bûyî, lê
dîsa jî destûrê nadin wî ku bi wê
re bizewice.

15 Û gava Cihûda wê dît, got qey
fahîşe ye. Ji ber ku ser çavê wê
pêçandî bû. 16 Û ber bi qeraxa rê
ve çû û bêyî zanîna ku bûka wî ye
got: De were, ez dixwazim ku bi
te re rakevim! Û wê, pirsa: Ger tu
bi min re rakevî, tuyê çi bi min dî?
ji wî pirsî.

17 Û wî got: Ez ji keriya xwe
ve, karikekê ji te re bişînim. Û
wê got: Gelo heta ku tu karikê
bişînî, tu dikarî tiştekî bi rehînî
bidî min? 18 Û wî jî: Ez çi bidim?
ji wê pirsî. Û wê, bi gotina: Mora
xwe, qeytanê xwe û şiva di destê
xwe de bersivê da wî. Û wî vana
dan wê û pê re raket. Û pîrek ji wî
ducanî bû. 19 Û rabû çû û pêçika
xwe derxist û dîsa kincê jinebîtiyê
li xwe kir.

20 Û di vê navberê de, Cihûda
bona pertalên xwe yî bi rehîntî
dayiye bîne, hevalê xwe yî
Adûlamî, tevî karikekê ji pîrekê re
şand. Çi heye ku wî, wê pîrekê ne-
dît. 21 Û ji kesên ku li wê dorê ve
dijiyan re bi gotina: Li Eynayîmê,
li qeraxa rê de fahîşeyek hebû, ew
li ku derê ye? ji wan pirsî. Û wan
bi gotina: Li vir pîrekek ûsa nine!
bersivê dan wî.

22 Li ser vêya hevalê wî vegeri-
ya cem Cihûda û pîrekê nedîtim,
got. Û him mirovên li wê derê
jî gotin: Li vir fahîşe nîne. 23 Û
Cihûda got: Bila pertal yên wê
bin. Em kesekî bi xwe ve nekenîn
in. A vay, karikê şandim, lê belê
te wê nedît.

24 Û nêzîkî sê meh pê re nûçeya:
Bûka te Tamar zinê kiriye û niha
ducanî ye! gîhandin Cihûda.
Cihûda got: Wê derxin derve û
bişewitînin!
25 Gava wê derxistin derve,
nûçeya: Ez ji xwediyê van per-
talan ve ducanî mam, ji xezûrê
xwe re şand û got: Ji kerema xwe
li van pertalan ve binêre. Ev mor
û qeytan û şiv, yê kî ne? 26 Û
Cihûda pertalan nas kir û got: Ew
ji min duristtir e. Ji ber ku min wê
ji lawê xwe Şela re neanî. Û ca-
rekî din jî bi wê re raneket.
27 Û gava wexta welidînê hat, hate
fêhm kirin ku di rehma wê de cêwî
heye. 28 Û gava welidînê dikir, yek
ji cotan destê xwe derxist derve. Û
pîrik bi destê lawik ve girt û tayekî
sor pê ve girê da û got: Viya pêşiyê
hate dinê[1]! 29 Û çi heye dema ku
zarok destê xwe ber bi hundir ve
kişand, di wê navberê de birayê
wî bû. Û pîrikê got: Ma te bi vî
awayî gêdûkê ji xwe re vekir? Bo
vê yekê, navê Pêrez[2] li lawik kirin.
30 Û dawiyê birayê wî, yê ku tayê
sor bi destê wî ve girê dabûn, hate
dinê. Û navê Zerah[3] li wî kirin.

*Ûsiv û Jina Potîfarê Misirî*

39 Û Ûsiv biribûn Misirê.
Wezîfedarê Fîrawûn, Fer-
mandarê komaleya parazkiran,
Potîfarê Misirî wî ji destê Îsmaîli-
yan ve stend.
2 Û XUDAN bi Ûsiv re bû û wî
serfiraz dikir. Û ew di mala efen-
diyê xwe yî Misirî de dima. 3 Û
efendiyê wî dît ku, XUDAN bi wî
re ye û di her karê ku dike de, wî
serfiraz dike. 4 Û ji Ûsiv dilxweş
ma û wî girt xizmeta xwe yî tay-
betî. Û berpirsiyariya mala xwe û
her tiştên ku lê xwedî bû da wî.
5 Ji dema ku ew bi berpirsiyariya
mala xwe û her tiştên ku lê xwe-
diye ve tayîn kir pêv, XUDAN bi
saya Ûsiv, mala yê Misirî pîroz
kir. Û di mala wî de, di zeviya wî
de û di her tiştên ku aidî wî bûn
de bereketa XUDAN hebû. 6 Û
wî berpirsiyariya her tiştên ku lê
xwedî ye, da Ûsiv û xeynî xwa-
rina ku dixwe, têkiliya xwe bi
tiştekî neanî. Û Ûsiv bejin zirav û
rû xweşik bû.
7 Û paşî va tiştana wusa bû ku,
jina efendiyê wî çav bera Ûsiv da
û got: Bi min re rakeve!
8 Lê belê wî, wê red kir û ji pîreka
efendiyê xwe re got: Ji ber ku ez li
vir im, efendiyê min hewce nabîne
ku têkiliya xwe bi tiştekî malê ve
bîne. Û: Rêvebiriya her tiştên ku
lê xwedî ye, da min. 9 Li vê malê,
ew ne ji min bilindtir e. Û xeynî

1 Viya pêşiyê bû.
2 Pêrez: Gêdûk vekirin.
3 Zerah: Sor.

te, tu tiştekî ji ber min neparast.
Ji ber ku tu jina wî yî. Û çawa ez
ê xerabiyek ûsa mezin bikim û li
dijî Xwedê gunehan bikim? 10 Û
her roj bona ku bi wê re rakeve, an
jî bi wê re be înyad kiribe jî, Ûsiv
xwesteka wê qebûl nekir.
11 Û rojekê Ûsiv, bona ku karên
xwe bike çû malê. Û di hundir de,
kes ji maliyan ve tune bû. 12 Û
wê bi kincê Ûsiv ve girt û got: Bi
min re rakeve! Lê belê Ûsiv kincê
xwe di destê wê de hişt û ji malê
reviya.
13 Û gava wê dît ku Ûsiv kincê
xwe hişt û reviya, 14 bangî xiz-
metkarên mala xwe kir. Û ji wan
re got: Li vêya binêrin! Vî Îbrani-
yê ku mêrê min wî aniye, me rezîl
kir. Hate cem min û xwest ku bi
min re rakeve. Û ez jî qêriyam.
15 Û gava bihîst ku diqêrim, kin-
cê xwe li cem min hişt û reviya
derve!
16 Û heta ku efendiyê wî hate malê,
kincê wî li cem xwe hişt. 17 Û eynî
tiştan ji wî re jî got: Kolê Îbranî,
yê ku te anîbû vir hate cem min
û xwest ku min biçûk bike. 18 Lê
gava ez qêriyam, kincê xwe li cem
min hişt û reviya!
19 Û efendiyê wî; gava gotinên
jina xwe ya ku bi gotina: Kolê te
bi min re ûsa kir têgîhandinên wê
bihîst, zehf hêrs bû. 20 Û efendi-
yê Ûsiv, bi wî ve girt û wî avêt
zîndanê, cem girtiyên qiral. Û li
wê derê di zîndanê de ma. 21 Lê
belê XUDAN bi Ûsiv re bû. Û
qenciyê nîşanî wî da. Û serokzîn-
dan ji Ûsiv ve dilxweş ma. 22 Û
serokzîndan rêvebiriya hemû gir-
tiyan da destê Ûsiv. Û berpirsiyarê
her tiştên ku li zîndanê dibûn û di-
qediyan ew bû. 23 Serokzîndan,
qet têkiliya xwe bi karên ku dabû
berpirsiyariya Ûsiv re nedianî. Ji
ber ku XUDAN bi wî re bû û di
her karê ku dikir de, XUDAN wî
serfiraz dikir.

*Ûsiv Xewna Girtiyan Şîrove dike*

40 Û paşî van tiştna, wusa bû
ku, meyger û firnevanê qi-
ralê Misirê, li dijî efendiyê xwe
qiralê Misirê guneh kirin. 2 Û
Fîrawûn bi van her du wezîfe-
darên xwe ve, bi serokmeyger û
serfirnevanê xwe ve hêrs bû. 3 Û
wan li mala fermandarê komaleya
parazkiran, li zîndana ku Ûsiv tê
de bindest e, girt bin çavan. 4 Û
fermandarê komaleya parazkiran
Ûsiv da xizmeta wan. Û wî xiz-
metê ji wan re kir û demekê di
zîndanê de man.
5 Firnevan û meygerê Fîrawûn, di
zîndana ku tê de girtîne, di eynî
şevê de her yek xewnekê dîtin.
Xewnên wan di manên cuda de
bûn. 6 Û sibehê gava Ûsiv çû cem
wan û dît ku û a vay, ew aciz in.
7 Û ji wezîfedarên Fîrawûn, yên
ku li mala efendiyê wî, tevî wî di

zîndanê de dimînin re; bi gotina:
Çima îro wecê we daliqandiye?
pirsî. 8 Û ji wî re gotin: Me xewn
dîtine, lê belê tu kesê ku şîrove
bike nîne. Û Ûsiv ji wan re got:
Ma şîrove ne xisûsiyeta Xwedê
ye? Ji kerema xwe, xewnên xwe
ji min re bibêjin!
9 Û serokmeyger xewna xwe ji
Ûsiv re got: Di xewna xwe de a
vay, li ber min mêwekî[1] 10 û di
mêwê de sê şivên wê hebûn. Û
çawa ku kulîlk vekirinvenekirin,
bûn çîçeg û goşî bi goşî tirî dan.
11 Û kasa Fîrawûn di destê min
de bû. Û bi tiriyan girtim û di kasa
Fîrawûn de guvaştim. Û kasê dam
destê Fîrawûn.
12 Û Ûsiv ji wî re got: Ev tê vê
manê: Sê şiv, tê mana sê rojî.
13 Dê di nava sê rojî de Fîrawûn
te ji zîndanê ve derxîne, tuyê
dîsa vegerî wezîfa xwe yî kevin.
Û mîna ku di derbasiyê de bûyî,
tuyê dîsa meygeriyê ji Fîrawûn re
bikî. 14 Lê belê ger her tişt rast
biçe, ji kerema xwe min di bîra
xwe de bîne û qenciyekê bike, ji
Fîrawûn re qala min bike û min ji
vê zîndanê ve derxîne! 15 Ji ber
ku ez bi zorê ji welatê Îbraniyan
hatim dizîn[2]. Û li vir jî tiştekî ku
min bavêjin zîndanê nekirim!
16 Û serokfirnevan gava vê
şîroveya qenc bihîst, ji Ûsiv re
got: Min jî xewnekî dît. Û a vay, li
ser serê min, sê selikên nanê sipî
hebûn. 17 Û di selika ku herî di
ser de ye de, cûr be cûr çorekên
bona Fîrawûn hatine çêkirin he-
bûn. Û civîkan, ji sepeta ku li ser
serê min e, çorekan dixwarin.
18 Û Ûsiv bersivê da: Ev tê vê
manê got: Sê selik, tê mana sê
rojî. 19 Êdî di nava sê rojî de dê
Fîrawûn te ji zîndanê ve derxîne
û bi darê ve daliqîne. Û dê civîk
goştên te bixwin!
20 Û paşî sê rojê di roja xwe yî
bûyînê de, Fîrawûn dawetek da
hemû wezîfedarên xwe. Û li ber
wezîfedarên xwe, serokmeyger
û serfirnevanê xwe ji zîndanê
ve derxist. 21 Û li gor şîrova ku
Ûsiv kiribû, serokmeygerê xwe
da wezîfa wî yî kevin. Û bona
Fîrawûn, dest bi pêşkêşiya xemrê
kir. 22 Lê belê wî serokfirnevan
daliqand. 23 Lê belê serokmeyger
Ûsiv di bîra xwe de neanî û wî ji
bîr kir.

*Ûsiv Xewna Fîrawûn Şîrove dike*

41 Û bêkêmasî paşî du salên
din, Fîrawûn xewnekê
dît. Û a vay, li qeraxa çem ve
sekinîbû. 2 Û a vay, ji çem heft
çêlekên xweşik û qelew derke-
tin. Di nava qamiran de dest bi
çêrandinê kirin. 3 Û a vay, piştî

---

1 Mêva tirî.

2 Hatim revandin.

wan heft çêlekên kirêt û lawaz
derketin. Û di qeraxa çem de,
li cem çêlekên din sekinîn. 4 Û
dema çêlekên kirêt û lawaz, heft
çêlekên xweşik û xwurt xwarin,
Fîrawûn hişyar bû.
5 Û dîsa bi xewê ve çû, vê carê jî
xewnek din dît: Û a vay, di seri-
yekî de heft similên xweşik û tijî
derketin. 6 Û a vay, piştî wan heft
similên lawaz û bi bayê rojhilatê
ve qemirandî derketin. 7 Û si-
milên lawaz, heft similên xweşik
û tijî daqurtandin. Û Fîrawûn
hişyar bû, a vay, ev xewnek bû!
8 Û sibehê gava hişyar bû, canê
wî bi xem bû. Û hemûya sêrbaz û
zaniyarên Misirî da bang kirin. Û
Fîrawûn xewnên ku dîtibû, ji wan
re gotin. Lê belê yek jî ji wan,
xewnên Fîrawûn şîrove nekirin.
9 Û di vê navberê de, serokmey-
ger ji Fîrawûn re got: Divê ez îro
sûcê xwe îtiraf bikim! 10 Gava
Fîrawûn bi min û serfirnevan qûlên
xwe ve hêrs bû, me avêt zîndanê,
mala fermandarê komaleya pa-
razkiran. 11 Û di şevekê de min
û wî xewnê dîtin. Xewnên me di
mahnên cuda de bûn. 12 Û li wir
tevî me, koleyê fermandarê ko-
maleya parazkiran xortekî Îbranî
hebû. Û me xewnên ku dîtibûn, ji
wî re gotin. Û xewnên me ji me
re şîrove kirin. Ji me her yekî re
li gor xewnên me şîrove kir. 13 Û
her tişt, li gor şîrove kirina wî der-
ketin: Ez vegeriyam wezîfa xwe û
ew jî hate daliqandin!
14 Û Fîrawûn Ûsiv da bang kirin.
Û hema wî ji zîndanê ve derxis-
tin. Û wî paşî xwe da kur kirin û
kincên xwe guhert, derket hizûra
Fîrawûn.
15 Û Fîrawûn ji Ûsiv re got:
Xewnekê dîtim. Lê belê kes hêz
pê neanîn ku şîrove bikin. Û di
derbarê te de ûsa bihîstim ku, tu
şîrova li her xewnên ku dibihîzî
dikî.
16 Û Ûsiv bersivê da Fîrawûn
got: Ez nikarim şîrove bikim.
Dê Xwedê bersiva bi xêr bide
Fîrawûn!
17 Û Fîrawûn ji Ûsiv re, dest bi
gotinê kir: Ez di xewna xwe de li
qeraxa çemekî sekinîbûm. 18 Û a
vay, ji çem ve heft çêlekên xweşik
û qelew derketin. Û di nava qa-
miran de dest bi çêrandinê kirin.
19 Û a vay, piştî wan heft çêlekên
zişt û lawaz derketin. Min li
hemûyê welatê Misirê ve çêlekên
qasî wan zişt nedîtin. 20 Û çêlekên
zişt û lawaz, heft çêlekên xweşik
û xwurt yên ku pêşiyê derketibûn
xwarin. 21 Lê belê xuyanîbû-
na wanî xerab nehat guhertin. Û
mîna ku tiştekî nexwaribin dihatin
xuyanî kirin. Û ez hişyar bûm.
22 Û ya din, di xewna xwe de
dîtim ku; di seriyekî de heft si-
milên xweşik û tijî derketin. 23 Û
a vay, piştî wan heft similên çil-

misî, lawaz û bi bayê rojhilatê ve
qemirandî derketin. 24 Û similên
lawaz, heft similên xweşik daqur-
tandin. Û vêya ji sêrbazan re go-
tim. Lê belê yekî hêz neanî ku ji
min re şîrove bike!
25 Û Ûsiv ji Fîrawûn re got: Her
du xewnên Fîrawûn jî tên yek
mahnê; Xwedê, tiştê ku dixwaze
bike, têgîhandiye Fîrawûn. 26 Heft
çêlekên xweşik, tê mana heft salan.
Û heft similên xweşik jî heft sal in.
Xewn yek[1] e. 27 Û heft çêlekên zişt
û lawaz û heft similên çilmisî, la-
waz û bi bayê rojhilatê ve qemiran-
dî ne, yên ku dawiyê derketine jî tê
mana ku dê heft salan xela bibe.
28 Mîna ku ji Fîrawûn re gotim:
Xwedê tiştê ku dixwaze bike, rê
Fîrawûn dayiye. 29 A vay, dê heft
salan, li hemûya welatê Misirê
zêdeyiyek[2] mezin bibe. 30 Û piştî
wan heft sal, dê xelayek ûsa bibe
ku, di welatê Misirê de dê hemûya
salên zêdeyiyê qet di bîr de nên.
Û ji ber ku dê xela, welat bide ber
xwe û biqemirîne. 31 Xelaya ku li
pêy zêdeyî were, dê firehiyê bide
ji bîr kirin, ji ber ku dê zehf dij-
war be. 32 Û mana, di derheqê vê
babetê de, du cara dîtina xewnan
ew e ku; ji ber Xwedê qirara xwe
yî biryarî dayiye û di demekî herî
kurt de dê bîne cîh.
33 Û niha divê Fîrawûn zilamek
baqil û zaniyar bibîne û bîne serê
Misirê. 34 Divê Fîrawûn di tûmi-
ya welat de zilaman bi wezîfedarî
bike û vana di heft salên firehiyê
de, ji pêncan yekê zadan berhev
bikin. 35 Û bila hemû zadên salên
qenc yên ku tên berhev bikin û di
bin rêvebiriya Fîrawûn de wan
veşêrin û biparêzin. 36 Û ev zada
dê di tûmiya heft salên xela yên
ku werin de bi mîneqî[3] bên xe-
bitandin û welat dê ji xelayê ve
neşikê!

*Ûsiv dibe Rêvebirê Misirê*

Zeb 105,17-22; K.Şa 7,9-10

37 Û vê pêşniyara ji Fîrawûn û
wezîfedarên wî re qenc hate xuya
kirin. 38 Û Fîrawûn ji wezîfe-
darên xwe re; bi gotina: Gelo em
ê bikaribin mîna vî zilamî, yekî
xwediyê Ruhê Xwedê yî bibînin?
pirsî.
39 Û Fîrawûn ji Ûsiv re got: Ma-
dem ku Xwedê, vana hemûyan ji
te re eşkere kir, zilamek di ser te
de baqil û zaniyar nîne. 40 Ez ê
rêvebiriya qesra xwe bidim te. Û
dê hemûya gelê min, li gor emirên
te bikin. Tenê ji ber textê, ez ê ji
te mezintir bim! 41 Û Fîrawûn ji
Ûsiv re got: A vay, ez te ji hemûya
Misirê ve, bi rêvebirî tayîn kirim.

---

1 An jî: Xewn tê eynî mahnê; mahne yek e.
2 Bereket, xenitî.
3 Îhtiyadî.

42 Û Fîrawûn mora xwe ji tili-
ya xwe derxist û xist tilîka Ûsiv.
Û kincek ji kitana[1] bi rûmet li wî
kir û zincîra zêrînî xist histuyê wî.
43 Û li ereba alîkirê xwe ve siwar
kir. Û li ber wî bi gotina: Çong bi-
din erdê! qêriyan. Û bi vî awayî, wî
rêvebiriya hemûya Misirê da wî.
44 Û Fîrawûn ji Ûsiv re got:
Fîrawûn ez im. Lê belê li Misirê,
tu kes bêyî destûra te dê nikaribe
dest û lingên xwe kil bikin. 45 Û
navê Safnat-Paneah li Ûsiv kir. Û
Asenata qîza Potîfera yê kahînê
bajarê Onê ye jî bi jinitî da wî.
Ûsiv li ser û peya hemûya welatê
Misirê ve geriya.
46 Û gava Ûsiv ketibû xizmeta
Fîrawûn, sîh salî bû. Û Ûsiv ji hi-
zûra Fîrawûn ve qetiya, li hemûya
welatê Misirê ve geriya. 47 Û di
heft salên firehiyê de zevî zehf ber
da. 48 Û hemû zadên di heft salan
de li Misirê gîhaştiye da ber hev
kirin û li bajaran depo kir. Li her
bajarî, zadên li dora wî bajarî der-
ketin danî. 49 Û qasî qûma behrê
genim da veşartin ûsa ku dev ji ji-
martinê ve berda. Ji ber ku genim,
qasî nayê jimartin zêde bû.
50 Û berî ku salên xelayê dest pê
bikin, Asenata qîza Potîfera yê
kahînê bajarê Onê, ji Ûsiv re du
lawik anîn dinê. 51 Û Ûsiv, navê
Manaşşe[2] li lawê xwe yî yekem
kir. Ji ber ku: Xwedê hemû êşên
min û malbata bavê min, bi min
ve da bîr kirin, got. 52 Û bi go-
tina: Xwedê li welatê ku lê ten-
gasiyê dikişandim, min bi berdar
kir navê Efrayîm[3], li lawê xwe yî
duwem kir.
53 Û li Misirê, heft salên firehiyê
qediyan. 54 Û mîna ku Ûsiv go-
tibû, heft salên xelayê dest pê ki-
rin. Û di hemûya welatan de xela
hebû. Lê belê li her aliyê Misirê
nan hebû[4]. 55 Û gava hemûya
welatê Misirî birçî man, gel ji bo
nan lava ji Fîrawûn re kirin. Û
Fîrawûn ji Misiriyan re got: Herin
cem Ûsiv! Ew ji we re çi bibêjî ûsa
bikin! 56 Û gava xela li hemûya
welat girt Ûsiv embaran vekir û
bona Misiriyan, dest bi firotina
genim û zad kir. Ji ber ku xela,
der û dorê Misirê dişewitand[5].
57 Û ji hemû welatan, mirovan
bona stendina genim hatin Mi-
sirê, cem Ûsiv. Ji ber ku xela, bi
hemûya dinê ve girtibû û dijwar
bû.

*Birayên Ûsiv diçin Misirê*

42 Û gava Aqûp dît ku li Mi-
sirê genim heye, ji lawên
xwe re, bi gotina: Çima hûn li hev
û din dinêrin û disekinin? got. 2 Û

---

1 Bizêrek.
2 Manaşşe: Yê ku dide bîr kirin.
3 Efrayîm: Bi du qatî bereket.
4 Zad dihat dîtin, zad hebû.
5 Diqemirand, an jî: Bişîdet bû.

wî got: Bihîstim ku li Misirê ge-
nim heye. Herin, bistînin ku em
bijîn, ya na em ê bimirin!
3 Û bi vî awayî, deh birayên
Ûsiv, bona stendina genim, çûn
Misirê. 4 Lê belê Aqûp, Ben-
yamînê birayê Ûsiv bi wan re
neşand, ji ber ku wî got: Nebe
ku tiştek were serê wî. 5 Di nav
mirovên ku hatine genim bistînin
de, lawên Îsraêl jî hebûn. Ji ber
ku li welatê Kenanê xela hikma
xwe didomand.
6 Û Ûsiv rêvebirê welat bû, wî
genim difirot her kesî. Û birayên
wî hatin û li ber wî bi erdê ve
xwar bûn. 7 Û gava Ûsiv birayên
xwe dît, nas kir; lê belê ji wan re
mîna biyanekî kir, bi tundî axifî û
ji wan re got: Hûn ji ku derê tên?
Û wan ji wî re gotin: Ji welatê
Kenanê, em bona stendina zad
hatin!
8 Û çawa ku Ûsiv birayên xwe
nas kiribe jî, birayên wî, wî nas
nekirin. 9 Û Ûsiv xewnên di der-
heqê wan de dîtibû, di bîra xwe
de anî û ji wan re got: Hûn sîxur
in. Hûn, bona li welat hînî aliyê
lawaz bibin hatine.
10 Û wan jî ji wî re gotin: Na
efendiyê min; lê em qûlên te,
bona stendina zad hatine! 11 Em
gişt lawên bavekî ne. Em qûlên te
mirovên durist in, ne sîxur in!
12 Û wî ji wan re got: Na! Lê hûn
bona hînbûna welat yên lawaz ha-
tine.
13 Û wan gotin: Em qûlên te
donzdeh bira ne. Em gişt lawên
bavê ku li welatê Kenanê dijî ne.
Û ev e, îro yê herî biçûkê me, li
cem bavê me ma, yek jî tune[1].
14 Û Ûsiv ji wan re got: Mîna ku
dibêjim: Hûn sîxur in! 15 Hûn ê bi
vê bên ceribandin. Ez ê we bice-
ribînim. Ez bi serê Fîrawûn son-
dê dixwim. Heta ku birayê we yî
biçûk neyê vir, hûn nikarin ji vir
herin! 16 Yekî ji nav xwe bişînin,
bila birayê we bîne. Lê belê hûn,
dê di bin çava de bên girtin. Hela
gotinên we rast in an jî ne rast in,
em ê we biceribînin. Ger ne ûsa
be, ez bi serê Fîrawûn sondê di-
xwim ku hûn sîxur in! 17 Û sê ro-
jan wan di bin çavan de girt[2].
18 Û roja sêwemîn Ûsiv ji wan
re got: Ez ê bi şertekî canê we
bibexşînim. Ez ji Xwedê ditirsim.
19 Bona ku duristiya we bê îspat
kirin, bila yek ji nav we li mala
ku hûn di bin çava de ne bimî-
ne, yên din jî herin û ji malbata
we yî birçî mayî re genim bibin.
20 Û birayê xwe yî biçûk ji min
re bînin. Bi vî awayî dê rastî an jî
xeletiya gotinên we derkeve holê.
Hûn ê ji mirinê ve xelas bibin. Û
wan wusa kir. 21 Û ji hev û din re

1 An jî: Winda bû.
2 Avêt hepsê.

gotin: Bi rastî[1] xuyanî ye ku, em
cezayê tiştên ku me li birayê xwe
re kirin dikişînin. Gava li ber me
geriya, me dîtin ku çawa tenga-
siyê dikişîne, lê belê me guhdarî
nekirin? Ev tengasiya bo wê hate
serê me! 22 Rûben bersivê da
wan û got: Ma min we îkaz nekir?
Bona ku hûn xesarê nedin lawik.
Lê belê we guhdarî nekirin. A vay,
niha hisabê xwîna wî tê pirsîn! 23
Û wan nezanîbû ku Ûsiv axaf-
tinên wan fêhm dike, ji ber ku bi
wî re, bi navdîtiya wergervanekî
diaxifîn.
24 Û ew ji birayê xwe cuda bû û
dest bi giriyê kir. Û dawiyê vege-
riya cem wan û bi wan re axifî û
ji nav wan Şîmeûn rahişt û li ber
çavên yên din, wî girê da. 25 Û
Ûsiv bona ku kîsikên wan bi ge-
nim ve bên dagirtin û perên wan
li wan bêne vegerandin û bona rê
xwarinê bi wan din, emir da. Û
paşî ji wan re vana hatin çêkirin.
26 Û genimên xwe li kerên xwe
bar kirin û ji wir ve cuda bûn.
27 Û li cîhê ku qonax danîbûn,
yekî bona ku êm bide kerê xwe
gava devê kîsê xwe vekir, perê
xwe dît. Û pere xistibûn devê kîs.
28 Û ji birayên xwe re, bi gotina:
Perê min li min vegerandine bang
kir. Û: A vay, di kîsê min de yî! Û
dilê wan ji cîh hol bû. Û bi lerizînê
ji hev û din vegeriyan û gotin:
Vêya ku Xwedê bi me dike çî ye?
29 Û gava gîhaştin welatê Ke-
nanê, cem bavên xwe Aqûp û
tiştên ku hatine serê wan, ji wî re
gotin: 30 Rêvebirê welat, bi tundî
bi me re axifî. Mîna ku em sîxur
bin, ji me re kir. 31 Û me ji wî re:
Em mirovên durist in, gotin: Ne
sîxur in. 32 Em gişt lawê bavekî
ne. Donzdeh bira ne; yek tune û
yê herî biçûk jî îro li welatê Ken-
anê, li cem bavê me ye.
33 Û wî mirovî, rêvebirê welat
ji me re: Ez dikarim bi vî awayî
duristiya we fêhm bikim got: Yekî
ji birayên xwe li cem min bihêlin
û genimê bigirin û ji malbatên
xwe yî birçî mayî re bibin. 34 Û
birayên xwe yî biçûk jî ji min re
bînin. Wê çaxê ez ê fêhm bikim
ku hûn ne sîxur in, mirovê durist
in û ez ê birayê we li we vegerî-
nim. Û hûn ê bikaribin li welat ve
danûstendinê bikin.
35 Û gava kîsên xwe vala kirin,
hemû kîsikên xwe yî pera di kîsê
xwe de dîtin. Û gava kîsê peran
dîtin, him ew û him jî bavên wan
bi tirsê ve ketin. 36 Û bavê wan
Aqûp ji wan re got: Hûn min ji za-
rokên min ve mehrûm dikin. Ûsiv
nîne, Şîmeûn nîne. Niha jî hûn
dixwazin ku Benyamîn bibin! Ev
hemû tên serê min!
37 Û Rûben ji bavê xwe re got:
Ger ez wî ji te re neynim, her du

1 Bi eşkeretî (ya rast).

lawên min jî bikuje. Tu wî bide destê min, ez ê jî wî ji te re şunda bînim! 38 Lê belê wî got: Ez ê lawê xwe bi we re neşînim. Ji ber ku birayê wî mir û tenê ew ma. Û ger di rê de xesarek bi wî ve bê, hûn ê bi vê êşê, serê minî por sipî bibin gorê!

*Rêvitiya Misirê ya Duwemîn*

43 Û li welêt, xela dijwar bûbû. 2 Û gava genimên ku ji Misirê ve hatibûn anîn qediya, bavê wan ji wan re got: Dîsa herin, hinek zewade ji me re bikirin!

3 Û Cihûda ji wî re, bi gotina: Ew zilama zehf ji me re îkaz kir bersivê da. Ger birayê we tevî we nê, hûn nikarin wecê min bibînin! got. 4 Ger tu birayê me bi me re bişînî, em ê herin û zewade ji te re bikirin. 5 Lê belê ger tu nede, em naçin. Ji ber ku wî zilamê ji me re: Ger birayê we tevî we nê, hûn nikarin wecê min bibînin! got.

6 Û Îsraêl got: Çima we ji zilam re gotin, birayek me yî din heye, çima we bi vê gotina, vê xerabiyê ji min re kirin?

7 Û wan bi vî awayî bersivê dan: Ew zilama pirsa: Gelo bavê we hîn dijî? Wekî din birayê we heye? ji me pirsî. Di derheqê me û merivên me de ûsa pirsan pirs kir ku, em jî hewce man û me bersivê dan wî. Ma me ji ku dizanîbûn ku dê bibêje birayên xwe bînin?

8 Û Cihûda ji bavê xwe Îsraêl re got: Lawik bi min re bişîne û em rabin û herin. Wê gavê, tu jî, em jî, zarokên me jî namirin, em ê bijîn. 9 Ez dibim kefîlê wî. Min berpirsiyar bihesibîne. Ger ez wî venegerînim te û dernexînim ber te, ez di hemûya temena xwe de[1], li hemberî te bi sûc bêm hesibandin. 10 Ji ber ku ger em dereng nemana, heta niha em du cara çûbûn û hatibûn!

11 Û li ser vêya bavê wan Îsraêl ji wan re got: Ger wusa be, wê gavê herin. Hinek hungiv, belesan û bihîf û fisteq û mezeloqên darînî[2] têxin kîsên xwe. Bi xelatî ji wî zilamî re bibin. 12 Û du qat pere bigirin cem xwe. Û perê ku xistibûn devê kîsên we, vegerînin. Dibe ku xeletiyek bûbe. 13 Û birayên xwe bigirin û herin, vegerin cem wî zilamî. 14 Û bila Xwedayê ku hêza wî têra her tiştî ye, bona we dilovaniyê têxe dilê wî zilamî ku, zilam tevî birayên we yî din, Benyamîn jî bide we[3]. Û ger ez ê ji zarokên xwe ve mehrûm bimînim, bila bimînim[4]!

15 Bi vî awayî zilaman, ev xelata û du qat pere û Benyamîn girtin cem

1 Heta bêdawiyan.
2 Laden û kître.
3 Li we vegerîne.
4 Bila ûsa be.

xwe, çûn Misirê û derketin hizûra
Ûsiv. 16 Û Ûsiv, gava Benyamîn li
cem wan dît, ji keyayê xwe re got:
Van zilaman bibe malê û heywane-
kê serjêke û amade bike. Ji ber ku
dê nîvroj bi min re firavînê bixwin!
17 Û keya mîna ku Ûsiv emir
dabû, wan zilaman bir mala Ûsiv.
18 Û çi heye ku, zilaman ji ber ku
wan birin mala Ûsiv tirsiyan. Qey
bona perê ku cara yekemîn em
hatin, xistibûn devê kîsên me, me
dibin! gotin: Dixwaze ku êrîşî me
bike, li me bibe serwer, me bike
kole û kerên me ji me bistîne!
19 Û nêzîkî keyayê Ûsiv bûn û
di deriyê xanî de bi wî re axifîn:
20 Eman efendiyê min! gotin.
Cara yekem, bona zewade sten-
dinê em hatibûn vir. 21 Û li cîhê
ku me qonax danî, em lê nihêrtin
ku perê me bê kêmasî danîne devê
kîsên me. Û me, wê bi destê xwe
dîsa anîn. 22 Û wekî din, bona
dîsa zewade bikirin, me perên din
jî anîn. Em nizanin ku kî pere xis-
tiye kîsên me!
23 Û wî got: Silamet ji we re!
Metirsin! Xwedayê we û Xwe-
dayê bavê we xezînê xistiye kîsên
we. Pereyê we hate cem min[1]. Û
Şîmeûn ji wan re anî.
24 Û wî zilamî wan bir mala Ûsiv
û bona ku lingên xwe bişon avê
anî û êm da kerên wan. 25 Û wan
heta nîvro, saeta ku Ûsiv bê, xe-
latên xwe amade kirin. Ji ber,
bihîstibûn ku dê li wir xwarinê
bixwin.
26 Û gava Ûsiv hate malê, xelatên
ku anîbûn pêşkêşî wî kirin û li ber
wî secde kirin. 27 Û wî li halê
wan pirsî û got: Gelo bavê we yê
ku we qala wî kiribûn çawa ye?
Hîn dijî?
28 Û wan bi gotina: Bavê me,
qûlê te qenc e bersivê dan: Hîn
dijî. Û wan bi hurmet xwe avêtin
ber wî û xwar bûn.
29 Û wî gava çav li wan dige-
rand, birayê xwe Benyamîn, lawê
dayika xwe[2] dît. Û got: Ma birayê
we yî biçûk, yê ku we ji min re
qala wî kiribûn ev e? Bila Xwedê
ji te re xêrê bike lawê min! 30 Û
Ûsiv hema[3] ji wir cuda bû, ji ber
ku gava birayê xwe yî biçûk dît,
dilê wî jan dabû. Cîhê ku lê bigirî
geriya. Û ket oda xwe û li wir gi-
riya.
31 Û paşî wî wecê xwe şuşt û
derket derve. Û xwe da hev û got:
Xwarinê bînin!
32 Û ji wî re cihê û ji birayên wî
re cihê û ji Misiriyên ku bi Ûsiv
re xwarinê dixwin re, cihê xizmet
hate kirin. Ji ber ku Misirî bi Îbra-
niyan re xwarinê nedixwarin û

1 Min bi xwe perê we stend.
2 Yê ku bi wî re ji dayikekê ye.
3 Bi lez.

vêya bi kerehî dihesibandin. 33 Û
ew li ber wî ji mezin heta biçûk, li
gor dora temenê ve rûniştin. Û bi
şaş û metalî zilaman li hev û din
nihêrtin. 34 Ji masa wî ve xwarinê
belav kirin û dan wan. Lê belê
para Benyamîn, ji yên din ve bi
pênc qatî zêde bû. Û vexwarin û
bi wî re demekî xweş borandin.

*Kaseya windayî*

44 Û Ûsiv bi vî awayî emir da
keyayê xwe û got: Kîsê van
zilaman, heta ku karibin bibin bi
zewade ve dagire. Û perê her yekî
jî têxe devê kîsên wan. 2 Û kaseya
mina zîvî û perê genimê wî jî têxe
devê kîsê yê herî biçûkê wan. Û
wî li gor ku Ûsiv gotibû kir.
3 Û gava sibehê ronahî bû, zila-
man tevî kerên xwe hatin bi rê ki-
rin. 4 Hîn ew zêde ji bajêr dûr ne-
ketibûn ku Ûsiv ji keyayê xwe re
got: Hema li pêy wan zilaman ve
bikeve. Û: Gava tu bighêje wan:
Çima we li ber qenciyê xerabiyê
kirin? bibêje. 5 Ma vêya, ne ka-
seya ku efendiyê min bi wê li re-
milê dinêre û xemrê vedixwe ye?
We bi kirina vêya, xerabiyê kirin!
6 Û ew gîhaşt wan û van goti-
nana ji wan re got. 7 Û wan ji wî
re gotin: Efendiyê me, çima tu
ûsa diaxifî? Bila ji me dûr be, em
qûlên te tiştekî ûsa nakin! 8 Ev e,
me perên ku di devê kîsên xwe de
dîtin, ji welatê Kenanê ve li te ve-
gerandin. Ma çawa em ê ji mala
efendiyê te zêr an jî zîv bidizin?
9 Ger di qûlekî te de derkeve, bila
bê kuştin û em jî bibin kolê efen-
diyê min.
10 Û wî got: Belê, bila mîna go-
tina we be. Ger di kî de derkeve,
ew ê bibe kolê min û yên din jî
dê bêsûc bên hesibandin. 11 Û lez
kirin û her yekî kîsên xwe daxis-
tin erdê û her yekî kîsê xwe veki-
rin. 12 Û wî ji mezin heta biçûk,
li kîsê hemûyan geriya. Û kase di
kîsê Benyamîn de derket.
13 Û wan, ji keserê ve ser û berê
xwe çirandin. Û her yekî kîsên
xwe li kerên xwe kirin û vegeri-
yan bajêr.
14 Û Cihûda tevî birayên wî gava
hatin mala Ûsiv, ew hîn li malê
bû. Û li ber wî bi erdê ve çûn.
15 Û Ûsiv ji wan re got: Çi ye ev
kirina we? Ma nehat bîra we ku,
yekî mîna min dikare li remila
binêre? 16 Û Cihûda, bi gotina:
Em çi bibêjin efendiyê me? ber-
sivê da. Çawa bibêjin? Û em xwe
çawa derxînin paqijiyê? Xwedê
sûcê me derxist holê. Efendiyê
me, em hemû kolên te ne êdî,
him em, him jî yê ku kase bi wî
re hatiye dîtin! 17 Û wî got: Kiri-
na tiştekî wusa bila ji min ve dûr
be! Zilamê ku kase bi wî re hati-
ye dîtin, dê bibe kolê min; lê belê
hûn bi dilxweşiyê ve vegerin cem
bavê xwe!

*Cihûda bona Benyamîn lava dike*

18 Û Cihûda nêzîkî wî bû û got:
Efendiyê min ji kerema xwe des-
tûrê bide, ez biaxifim. Bi qûlê
xwe ve hêrs nebe. Ji ber ku tu
jî bi tevî Fîrawûn, xwediyê yek
rayedariyê yî! 19 Efendiyê min,
te ji me qûlên xwe ve pirsî bû:
Bavê we, an jî wekî din birayê we
heye? 20 Û me jî, ji efendiyê min
re: Bavekî me yî kalepîr û birayek
me yî di kalepîritiya wî de bûyiye
heye gotibûn û: Birayê wî lawika
mir û ew bi xwe, lawekî tekane yê
dayika xwe yî. Û bavê wî zehf ji
wî hez dike.
21 Û te jî ji me qûlên xwe re: Wî
lawika ji min re bînin, ez bi çavê
xwe ve bibînim gotibû. 22 Û me
jî ji efendiyê min re, bi gotina: La-
wik nikare ji bavê xwe cuda bibe,
ji ber ku gava ji bavê xwe ve cuda
bibe, dê bavê wî bimire bersivê
dabûn te. 23 Û te jî ji me qûlên
xwe re: Ger birayê we yî biçûk bi
we re neyê, hûn nikarin carekî din
wecê min bibînin gotibû.
24 Û gava em vegeriyan cem bavê
xwe qûlên te, me gotinên efendiyê
min ji wî re gotin. 25 Û bavê me:
Dîsa herin, ji me re hinek xwarinê
bistînin got. 26 Lê belê me: Em
nikarin gotin. Ger birayê me yî
biçûk bi me re bê, em ê herin. Ji
ber ku ger birayê me yî biçûk ne
bi me re be, em nikarin wecê wî
zilamî bibînin.
27 Û qûlê te, bavê min ji me re
got: Hûn dizanin ku, jina min du
lawî ji min re anî dinê. 28 Û yek ji
cem min cuda bû. Û: Ew mutleqa
perçe bû, gotim û heta niha wî ne-
dîtim. 29 Û ger hûn viya jî bibin
û xesarek jî bê wî, hûn ê bi vê êşê
serê minî por sipî bibin gorê!
30 Û niha gava ez vegerim cem
bavê xwe qûlê te, ger lawik ne li
cem me be, bavê me wî nebîne, dê
bimire. Ji ber, yê ku wî bi jiyanê
ve girê dide, canê vî lawê wî ye.
31 Û em qûlên te jî, di nava êşê
de, em ê serê bavê xwe yî por sipî
daxin gorê. 32 Ji ber ku ez qûlê te,
bi vî lawikî ve bûm kefîl. Ji bavê
xwe re: Ger ez wî venegerînim,
ez ê di hemûya temena xwe de,
li hemberî te xwe bi sûc bihesibî-
nim gotim!
33 Û ji kerema xwe niha li dêvla
lawik, min ji koletiya xwe re qe-
bûl bike. Û bila lawik tevî birayên
xwe vegere. 34 Ji ber ku ger ew
ne li cem min be, ez ê çawa vege-
rim cem bavê xwe? Û xerabiya ku
were serê bavê min bibînim!

*Ûsiv kîbûna xwe dîyarî Birayên xwe dike*
K.Şa 7,13

45 Û Ûsiv li cem hemû zi-
lamên ku li cem wî sekinî
bûn, bi xwe negirt û bi gotina: Her
kesî ji vir derxînin! qêriya. Ûsa
ku, gava Ûsiv xwe bi birayê xwe
re da nasîn kes li cem wî tune bû.

2 Û bi ewqas dengek bilind giriya
ku, Misiriyan giriya wî bihîstin. Û
ev nûçe gîhaşt maliyên Fîrawûn.
3 Û Ûsiv ji birayên xwe re got: Ez
Ûsiv im! Gelo bavê min hîn dijî?
Û birayên wî zîq man, hêz neanîn
ku bersivê bidinê.
4 Û Ûsiv ji birayên xwe re got: Ji
kerema xwe, nêzîkî min werin! Û
ew nêzîk bûn. Û wî got: Birayê
we Ûsiv, yê ku we wî firotibûn
Misirê, ez im. 5 Û niha ji ber ku
we min firotin vir, nekesirin. Û
xwe bi sûcdar mekin. Ji ber Xwe-
dê, bona ku jiyanê[1] biparêze min ji
pêşiyê ve şand. 6 Ji ber ku, du sal
e, li welat xela heye û dê hîn pênc
salê din bidome. Dê kes nikaribe
cot bajo û zad biçîne. 7 Û Xwedê,
bona ku nîjada we biparêze û di
şiklekî nuwaze de canê we xelas
bike, min ji pêşiya we de şand.
8 Û niha yê ku min şandiye vir,
ne hûn in, lê belê Xwedê ye. Û
min ji Fîrawûn re kir bav û efen-
diyê qesra wî û rêvebirê hemûya
welatê Misirê. 9 Hema vegerin
cem bavê min û ji wî re; lawê te
Ûsiv ûsa dibêje bibêjin: Xwedê
min kir rêvebirê hemûya welatê
Misirê. Nesekine, were cem min!
10 Û tuyê li herêma Goşenê ve
bicîh bibe; tuyê tevî law û zazên
xwe û dewar û ga û her tiştên ku
tu xwediyê wan î, nêzîkî min be.
11 Û ez ê li wir, li te binêrim, ji
ber ku xela, hîn dê pênc salên din
bidome. Ya na tu jî malbata te û
her kesên ku aidî te ne jî, hûn ê
perîşan bibin.
12 Û ev e, hûn gişt bi çavên xwe
ve dibînin, birayê min Benyamîn,
tu jî dibînî ku bi rastî jî yê diaxifî
devê min e[2]. 13 Û li Misirê, hemû
mezinahiya min û hemû dîtinên
xwe ji bavê min re bibêjin. Û bavê
min hema bînin vir.
14 Û bi stuyê birayê xwe Ben-
yamîn ve girt û giriya. Û Ben-
yamîn jî giriya û wî himbêz kir.
15 Û wî bi girî, hemû birayên xwe
ramûsand. Û dawiyê birayên wî
dest pê kirin û bi wî re axifîn.
16 Û gava nûçeya hatina birayên
Ûsiv gîhaşt qesra Fîrawûn! Û
Fîrawûn û wezîfedarên wî dilxweş
bûn. 17 Û Fîrawûn ji Ûsiv re
got: Ji birayên xwe re bibêje ku:
Heywanên xwe bar bikin û herin
welatê Kenanê. 18 Û bavên xwe û
malbatên xwe bînin vir. Û ez ê ze-
viyên Misirê, yên herî qenc bidim
we. Û hûn ê rûnê welat bixwin.
19 Û ez emir didim ku, wekî din
tu vana ji wan re bibêje: Bona law
û jinên xwe ji Misirê ve erebeyan
bigirin û tevî bavên xwe werin
vir. 20 Bila çavên we li ser tiştê
we ve nemînin, ji ber ku çiyî qenc
li Misirê hebe, dê bibe yê we.

1 Mirovahiyê, Mirovan.

2 Yanê ez im.

21 Û lawên Îsraêl, tiştên ku hatine
gotin kirin. Û li ser emrê Fîrawûn
Ûsiv erebe û bona rê xwarinê da
wan. 22 Ji hemûyan re, ji her yekî
re qatek kincê bargîrî da; lê belê
ji Benyamîn re sê sed parî zîv û
pênc qat kincên bargîrî da. 23 Û
bi vî awayî, ji bavê xwe re li Mi-
sirê çiyî qenc hebe, bi hemûyan
barkirî deh ker û bona rêwîtiyê
genim, nan û deh kerên mê, yên
ku bi zewêde ve bar kirî şand.
24 Û gava birayên xwe bi rê kir û ji
wan re got: Di rê de şer mekin!
25 Û ew ji Misirê ve cuda bûn û
vegeriyan welatê Kenanê, cem
bavê xwe Aqûp. 26 Û ji wî re
gotin: Ûsiv hîn dijî! Û di ser de
bûye rêvebirê Misirê! Û dilê wî
sar ma[1]; ji ber ku bi wan bawer
nebû. 27 Û hemû gotinên ku Ûsiv
ji wan re gotiye, ji wî re gotin. Û
gava dît ku bona wan bibe Misirê
Ûsiv erebeyan şandiye, kêfa canê
bavê wan Aqûp vejiya[2]. 28 Û Îs-
raêl got: Temam! Lawê min Ûsiv
hîn dijî! Berî ku ez bimirim, ez ê
herim û wî bibînim!

*Aqûp diçe Misirê*

46 Û Îsraêl, bi tevî hemû
tiştên ku li wan xwedî ne,
derket rê. Û gava gîhaşt Beer-
Şeba û li wir, bona Xwedayê bavê
xwe Îshaq qurbanan serjê kir. 2 Û
wê şevê Xwedê, di xewn û xeya-
lekî de bi gotina: Aqûp! Aqûp!
bang kir. Û wî got: Ez li vir im!
3 Û wî got: Ez Xwedê me,
Xwedayê bavê te. Ji çûna Misirê
ve metirse. Ji ber ku ez ê li wir,
nîjada te bikim neteweyek mezin.
4 Ez ê tevî te werim Misirê û te
mutleqa dîsa vegerînim vî welatî.
Û dê destên Ûsiv, çavên te bigirin.
5 Û Aqûp ji Beer-Şebayê cuda
bû. Û lawên Îsraêl, bona bavê
xwe Aqûp bibin, li erebeyên ku
Fîrawûn şandibû, wî, zarok û
jinên xwe siwar kirin. 6 Aqûp û
bi wî re hemû nifşeya wî, hey-
wanên xwe û tiştên ku li welatê
Kenanê ve qezenc kiribû girt û
hatin Misirê; 7 bi xwe re lawên
xwe û lawên lawên xwe û qîzên
xwe û qîzên lawên xwe û hemûya
nifşeya xwe anî Misirê[3].
8 Navê lawên Îsraêl yên hatine
Misirê, ev in: Aqûp û lawên wî,
lawê Aqûp yê yekem Rûben.
9 Û lawên Rûben: Henox û Pallû
û Hesron û Karmî. 10 Û lawên
Şimeûn: Yêmûêl û Yamîn û Ohad
û Yakîn û Sohar û Şaûlê lawê
pîrekek Kenanî.
11 Û lawên Lêwî: Gerşon, Kohat
û Merarî. 12 Û lawên Cihûda: Er
û Onan û Şela û Pêrez û Zerah.

1 Bavê wan zîq ma.
2 Hate cîh.
3 An jî: Aqûp malbata xwe, lawên xwe, qîzên xwe û zazên xwe, heywanên xwe û malên ku li welatê Kenanê ve qezenc kiribû girt cem xwe û hatin Misirê.

Lê Er û Onan li welatê Kenanê
ve miribûn. Û lawên Pêrez: Hes-
ron û Hamûl bûn. 13 Û lawên
Îsşakar: Tola û Pûvva û Yob û
Şîmron. 14 Û lawên Zebûlûn:
Sered û Elon û Yahleêl.
15 Vana lawên ku Lêa ji Aqûp
re anîbû dinê ne. Lêa wan û qîza
xwe Dîna, li Paddan-Aramê
anîbû dinê. Van qîz û lawên Aqûp,
bi giştî sîh û sê kes bûn. 16 Û lawên
Gad: Sîfyon û Hagî, Şûnî û Esbon,
Erî û Arodî û Arelî. 17 Û lawên
Aşer: Yîmna û Yîşva û Yîşvî û Be-
riya û xwuşka wan Serah. Û lawên
Beriya: Heber û Malkiyel.
18 Vana lawên Zîlpa ya ku Laban
dabû qîza xwe Lêa, ji Aqûp re anîbû
dinê ne. Bi giştî şanzdeh kes bûn.
19 Lawên Rahêla jina Aqûp: Ûsiv û
Benyamîn. 20 Û li Misirê, du lawên
Ûsiv, bi navê Manaşşe û Efrayîm, ji
Asenata ku qîza Potîfa re yê kahînê
bajarê Onê ye bûn. 21 Û lawên
Benyamîn: Bela û Beker û Aşbel,
Gera û Naaman, Ehî û Roş, Mûpîm
û Hûppîm û Ard.
22 Vana lawên ku Rahêl, ji Aqûp
re anîbû dinê ne. Bi giştî çardeh
kes bûn. 23 Û lawê Dan: Hûşîm.
24 Û lawên Naftalî: Yahseêl û
Gûnî û Yeser û Şîllem.
25 Vana lawên Bîlhaya ku Laban
dabû qîza xwe Rahêl, ji Aqûp re
anîbû dinê ne. Bi giştî heft can bûn.

*Lawên Aqûp li Goşenê bicîh dibin*

26 Xeynî jinên lawên wî, canên
ku ji nîjada Aqûp bûn û bi wî re
hatin Misirê, bi giştî şêst û şeş kes
bûn. 27 Û tevî du lawên Ûsiv, yên
ku li Misirê bûyîne, malbata Aqûp
ya ku bi Misirê ve koç kiriye, bi
giştî heftê kes bûn.
28 Û wî bona ku rêya Goşenê
nîşanî wan bide, Cihûda ji pêşiyê
ve şand cem Ûsiv. Û gava ku ew
gîhaştin Goşenê, 29 Ûsiv ereba
xwe amade kir û bona derkeve
pêşwaziya bavê xwe Îsraêl, çû
Goşenê. Û çawa ku bavê xwe dît
û nedît xwe avêt histuyê wî û de-
mekî dirêj giriya.
30 Û Îsraêl ji Ûsiv re got: Êdî wecê
te dîtim pê ve, ez bimirim jî xemê
naxwim. Ji ber ku tu hîn dijî!
31 Û Ûsiv, ji birayên xwe û mali-
yên bavê xwe re got: Ez herim û
nûçeyê bigehînim Fîrawûn: Mali-
yên bavê min û birayên min yên
ku li welatê Kenanê ve dijîn hatin
cem min bibêjim. 32 Û ez şivantî
kirina we, heywan xwedî kirina
we, bo vê yekê tevî dewar, ga û
her tiştê xwe pev re anîna we bi-
bêjim. 33 Û ger Fîrawûn bang we
bike û: Hûn çi karî dikin? ji we
bipirse, 34 hûnê: Mîna bapîrên
me, em jî ji zarokantiya xwe ve
heywanan xwedî dikin! bibêjin
ku, bila we li herêma Goşenê ve
bi cîh bike; ji ber ku bo Misiriyan
hemû şivan kerihîn[1] in!

1 An jî: Ji şivanan ve dikerihin.

*Aqûp li ber Fîrawûn*

47 Û Ûsiv çû û bi gotina: Bav
û birayên min û tevî dewar
û ga û hemûya pertalên xwe, ji
welatê Kenanê ve hatin nûçeyê
da Fîrawûn û: A vay, li herêma
Goşenê ne. 2 Û pênc kesî ji nava
birayên xwe ve bijart û wan der-
xist hizûra Fîrawûn.
3 Û Fîrawûn ji birayên wî re,
bi gotina: Gelo hûn çi karî di-
kin? pirsî. Û wan bi gotina: Em
qûlên te, mîna bapîrên xwe şivan
in, bersivê dan Fîrawûn. 4 Û ji
Fîrawûn re gotin: Em bona de-
mekî derbasî hatin vî welatî. Ji
ber ku li welatê Kenanê xelayek
dijwar heye. Em nikarin bona
dewarên xwe mêrgan bibînin. Û
ji kerema xwe niha destûrê bide,
bila qûlên te li herêma Goşenê ve
bicîh bibin.
5 Û Fîrawûn ji Ûsiv re got: Bav û
birayên te, hatin cem te. 6 Welatê
Misirê, welatê te tê hesibandin.
Bav û birayên xwe li welat, li
cîhê ku herî qenc e bi cîh bike.
Bila li herêma Goşenê ve bicîh
bibin. Û ger li gor te, yên bi hu-
ner di nav wan de hebin, bona
ku li dewarên min binêrin, wan
wezîfedar bike.
7 Û Ûsiv, bavê xwe Aqûp anî û
derxist hizûra Fîrawûn. Û Aqûp
Fîrawûn pîroz kir. 8 Û Fîrawûn ji
Aqûp ve, bi gotina: Hêjmara salên
jiyana te çend in? pirsî.
9 Û Aqûp ji Fîrawûn re got: Salên
min yên li biyaniyê sed û sîh salî
qediyan. Lê belê sal zû û bi dij-
warî derbas bûn. Qasî salên biya-
niya bapîrên min dirêj nedomiya.
10 Û Aqûp Fîrawûn pîroz kir û ji
hizûra Fîrawûn ve cuda bû.
11 Û Ûsiv, bav û birayên xwe
li Misirê bi cîh kir û li gor emrê
Fîrawûn, li welat, li cîhê herî
qenc, li herêma Ramsesê milk da
wan. 12 Û wekî din ji bavê xwe
û birayên xwe û ji maliyên bavê
xwe re, qasî hejmara zarokên
wan, xwarinê peyde kir.

*Xela dijwar dibe*

13 Û xela ewqas dijwar bû ku, li
tu welatî jî zad û zewêde nema.
Welatên Misir û Kenanê ji xelayê
ve dişikiyan. 14 Û Ûsiv, li berdêla
genimê ku firotiye, hemûya pere-
yên li Misir û Kenanê berhev kir
û bir qesra Fîrawûn. 15 Û gava
pere li welatê Misir û Kenanê qe-
diya, Misirî çûn cem Ûsiv û gotin:
Xwarinê bide me! Ma çima em li
ber çavên te bimirin? Ji ber ku
perê me qediya.
16 Û Ûsiv got: Ger perên we
qediyabe, dewarên xwe bînin.
Ez di berdêla wan de xwarinê
bidim we. 17 Û bi vî awayî, de-
warê xwe ji Ûsiv re anîn. Û Ûsiv
di berdêla hespan û keriyên ga û
dewaran û keran de zewêde da
wan. Û di tûmiya salekê de di

berdêliya heywanên wan de, bi
nan wan xwedî kir.
18 Û gava wê sala qediya, sala
duwemîn dîsa hatin, ji wî re gotin:
Efendiyê min, em nikarin rastiyê
ji te veşêrin. Perê me qediya û me
dewarên xwe jî, dan te. Û xeynî
canê me û zeviyên me tu tiştlî ber
efendiyê min nema. 19 Ma çima
em li ber çavên te bimirin? Û ze-
viyên me bibin çol? Bi berdêliya
can û zeviyên me, zewêde bifiroşe
me. Û em tevî zeviyên xwe, bibin
koleyê Fîrawûn. Û tovê bide me
ku em nemirin û bijîn û bila zevî
jî nebin çol!
20 Û bi vî awayî Ûsiv, hemû ze-
viyên li Misirê, bona Fîrawûn
stend. Ji ber ku hemûya Misiri-
yan zeviyên xwe firotin, ji ber ku
xela bona vêya zorê dida wan. Û
hemûya zeviyan bûn yên Fîrawûn.
21 Wî ji serîkî Misirê, heta seriyê
din hemûya gel kir kole[1]. 22 Lê
zeviyên kahînan nestend. Ji ber
ku kahînan ji Fîrawûn ve meha-
ne[2] distendin û bi mehaneya ku
Fîrawûn dida wan, derbasiya xwe
didomandin. Bo vê yekê zeviyên
xwe nefirotin.
23 Û Ûsiv ji gel re got: Min we
û zeviyên we îro ji bona Fîrawûn
stendin. A vay, ji we re tov, çan-
dina zeviyên xwe bikin. 24 Û
gava we zadên xwe çinand, hûn
ê ji pêncan yekî bidin Fîrawûn. Û
çar dabeş jî bi tovî bikar bînin û
hûn û malbatên we û zarokên xwe
bixwin.
25 Û wan bi gotina: Te canê me
xelas kir, bersivê dan. Em di çavê
efendiyê xwe de xêrê bibinînin. Û
em ê bibin koleyê Fîrawûn.
26 Û Ûsiv, ji pêncan yekî ya dana
zeviyan, li Misirê kir zagona ze-
viyê. Heta îroj ji pêncan yekî yê
Fîrawûn e. Lê tenê zeviyên kahîn-
an nebûn yê Fîrawûn.
27 Û Îsraêl li Misirê, li herêma
Goşenê bi cîh bû. Û li wir bûn
xwedî milk û zehf zêde bûn.
28 Û Aqûp hivdeh sal li Misirê
jiya. Û temena Aqûp, bi tûmî
sed û çil û heft sal bû. 29 Û gava
rojên mirina Îsraêl nêzîk bûn,
bangî lawê xwe Ûsiv kir û ji wî
re got: Ger niha di çavê te de
xêrê dîtibim, ji kerema xwe destê
xwe têxe bin hêta min. Û di der-
heqê ku tuyê qenciyê û dilsoziyê
nîşanî min bidî de, sozê bide min.
Û ji kerema xwe, min li Misirê
binerd neke! 30 Ger ez kengê
bigihêjim bapîrên xwe[3], min ji
Misirê ve derxîne û li cem tirbên
wan binerd bike. Û wî bi gotina:
Ez ê mîna gotina te bikim bersivê
da wî.

1 Di Tewrata Samîriyê de û di Septûagînta de kir kole, di Îbranîtî de: Ber bi bajaran ve da koç kirin.
2 Meaş.
3 An jî: Ger ez bimirim.

31 Û wî got: Ji min re sondê bi-
xwe! Û wî (Ûsiv) ji wî re sondê
xwar. Û Îsraêl ber bi serê livînên
xwe ve secde kir[1].

*Aqûp Efrayîm û Manaşşe Pîroz dike*
Îbr 11,21

48 Û paşî van tiştan, bi gotina:
Bavê te nexweş e nûçe ji
Ûsiv re hat. Û wî her du lawên
xwe, Efrayîm û Manaşşe girt cem
xwe û derket rê. 2 Û bi gotina:
Lawê te Ûsiv tê cem te nûçeyê
dan Aqûp. Û Îsraêl xwe da hev û
di nava livînê xwe de rûnişt.
3 Û Aqûp ji Ûsiv re got: Xwedayê
ku hêza wî têra her tiştî dike, li
welatê Kenanê, li Lûzê ji min re
xuyanî bû û min pîroz kir û ji min
re got: 4 A vay, ez ê te bi berdar
bikim û zêde bikim û: Ez ê ji nîja-
da te zehf neteweyan biwelidînim.
Û paşî te, ez ê vî welatî bi milkî
heta bêdawîbûnê bidim nîjada te!
5 Û du lawên te yên ku berî ez
werim Misirê, bûyîne jî lawên
min tên hesibandin. Efrayîm û
Manaşşe, bona min, mîna Rûben
û Şîmeûn in! 6 Û bila lawên ku
piştî wan ji te re bibin, yên te bin.
Dê di mêrasa xwe de li gor navê
birayên xwe bên bang kirinê. 7 Û
gava ez ji Padanê vedigeriyam,
Rahêl, li welatê Kenanê, berî ku
bigihêje Efratê, li cem min mir. Û
li wir, li qeraxa rêya ku diçe Efratê
binerd kirim, ev Beytlehem e.
8 Û gava Îsraêl, lawên Ûsiv dît, bi
gotina: Vana kî ne? pirsî. 9 Û Ûsiv
ji bavê xwe re got: Ew lawên min
in; Xwedê, li vir wan da min! Û wî
got: Ji kerema xwe wan bîne cem
min, ez wan pîroz bikim! 10 Û ça-
vên Îsraêl, ji kalepîriyê qels bûbûn,
nedidît. Û wî lawên xwe bir cem
wî. Û wî, wan ramûsand û himbêz
kir. 11 Û Îsraêl ji Ûsiv re got: Min
qet bawer nedikir ku ez ê wecê te
bibînim. Lê belê a vay, Xwedê nî-
jadê te jî nîşanî min da!
12 Û Ûsiv lawên xwe ji himbêza
bavê xwe rahişt û li ber wî bi erdê
ve çû. 13 Û Efrayîm girt aliyê xwe
yî rast, ber bi destê Aqûp yê çep û
Manaşşe jî girt aliyê xwe yî çep û
ber bi destê Aqûp yê rast ve nêzîk
bir. 14 Îsraêl, bi çepûrastî destên
xwe dirêj kir, destê xwe yî rast,
danî ser serê Efrayîm yê biçûk,
yê çep jî danî ser serê Manaşşe. Û
destê xwe bi zanebûn guhert[2]. Ji
ber ku pêşiyê Manaşşe bûyî bû.
15 Û wî Ûsiv pîroz kir û got:
Xwedayê ku bapîrên min Birahîm
û Îshaq xizmetê ji wî re kirin. Yê
di hemûya jiyanê de heta vê roja
şivantiyê ji min re kiriye, 16 bila
milyaketê ku min ji hemû xerabi-

1 An jî Îsraêl, xwe sipar gopalê xwe û bi XUDAN ve peristinê kir, (ji XUDAN re peristî).
2 An jî: Bi çepûrastî destên xwe dirêj kir.

yan ve xelas kiriye, van zarokan
pîroz bike! Û navê min û navê
bapîrên min Birahîm û Îshaq, bila
bi van re bijî! Û bila di rûyê erdê
de, heta ku tu bibêjî zêde bibin!
17 Û Ûsiv gava dît ku bavê wî, destê
xwe yî rastê danî ser serê Efrayîm
û ji vêya dilxweş nebû. Û xwest ku
destê bavê xwe ji ser serê Efrayîm
rake û deyne ser serê Manaşşe.
18 Û Ûsiv ji bavê xwe re got: Bavo
ne ûsa ye! Ji ber ku pêşiyê ev bû.
Destê xwe yî rast deyne serê wî.
19 Lê belê bavê wî nexwest û got:
Dizanim lawê min, dizanim; dê ew
jî bibe gelek, ew jî mezin bibe. Lê
belê dê birayê wî yî biçûk, ji wî hîn
jî mezintir bibe û ji nîjada wî ve dê
pirr netewe biafirîn. 20 Û wê rojê
wan pîroz kir û got: Dê Îsraêlî, bi go-
tina: Bila Xwedê te mîna Efrayîm û
Manaşşe bike! Û bi navê we ve pîroz
bikin. Û bi vî awayî wî, Efrayîm
derbasî pêşiya Manaşşe kir.
21 Û Îsraêl ji Ûsiv re got: Ez li ber
mirinê me. Lê belê dê Xwedê bi we
re bibe. Û dê we dîsa vegerîne axa
bapîrên we. 22 Û ez parek ji birayên
te zêde didim te; min wê, bi kevan û
şûrê xwe ji Amoriyan ve stend.

*Gotinên Aqûp yên dawîn*

5.Mûs 33

49 Û Aqûp bangî lawên xwe
kir û got: Li cem min bici-
vin. Di hatinê de dê çi bibin, ez ji
we re bibêjim. 2 Ya lawên Aqûp,
bicivin û guhdarî bikin û guh bi-
din bavê xwe Îsraêl.
3 Rûben, tu lawê minî yekem,
hêza min û zadê yekem yê qudre-
ta min î! Ji aliyê hêz û birêziyê, yê
herî sereta ye! 4 Lê belê tu mîna
avê lîstok î, tuyê êdî nebe sereta.
Ji ber ku tu ji nava livînên bavê
xwe derket; wê çaxê te wê gemarî
kir. Te doşega min rezîl kir!
5 Şîmeûn û Lêwî bira ne, şûrên
wan dijwariyê vedirşîne. 6 Ya
canê min, tu nekeve sazûmanên
wan; ya bilindahiya min, tu
beşdarî civakên wan nebe! Ji ber
ku gava ew hêrs bûn, zilam kuştin
û her ku canê wan dixwest, gayan
seqet kirin. 7 Bila nalet li hêrsa
wan be, ji ber ku ew dijwar bû û
bila nalet li xezeba wan be; ji ber
ku bi zalimiyê bû! Ez ê wan di
Aqûp de par bikim û di Îsraêl de
belav bikim.
8 Cihûda, dê birayên te pesnên te
bidin; destê te di stukura neyarên
te de be. Dê lawên bavê te, li ber te
xwar bibin. 9 Cihûda şêrek ciwan
e. Lawê min! Tu ji nêçîra xwe
vedigere û li ser çongên xwe rûdine;
mîna şêrek û şêrek mê radikevî. Kî
dikarî wî ji cîhê wî rake? 10 Heta
ku Şîlo[1] bê, dê gopalê[2] qiraletiyê
ji destê Cihûda ve dernekeve,

1 Xwediyê wê.

2 Asa, çov, an jî: Dar.

rêvebirî dê tim di nav lingên[1] wî
de bimîne û netewe, dê li gotinên
wî guhdarî bikin. 11 Dê kerê xwe
li mêwekê û dahşika xwe jî li
guliyek bijartî ve girê bide; kincên
xwe dê di xemrê de û qeftanê xwe
jî di xwîna gewez ya tiriyê de bişo.
12 Dê çavên wî ji xemrê ve
geweztir û diranên wî ji şîr ve
sipîtir be.
13 Dê Zebûlûn li qeraxa behrê bijî
û ji keştiyan ve bibe keştîxane û dê
sînorê wê heta Sayda dirêj bibe.
14 Îsşakar, mîna kerê xwurt yê di
nava hevşên mîhan de raketî ye.
15 Û wî cîhekî qenc, yê ku lê ra-
weste û welatek ku jê hez bike dît
û bona ku bar lê bikin pişta xwe
xwar kir û di bin kar de bû xiz-
metkar[2].
16 Dê Dan, rêvebiriyê li gelê
xwe bike, eynî mîna eşîrek Îsraêl.
17 Dê Dan di qeraxa rê de bibe
marek, di rêya axînî de bibe mar-
gîskek; margîskê ku bi vedana
pahniya hespê û siwarê wê ji pişta
wê dixîne xwarê. 18 Ez li benda
xelas kirina te me, ya XUDAN!
19 Dê Gad, rastî êrîşa êrîşkiran
bibe, lê Gad jî dê êrîşî pahniya
wan bike.
20 Dê nanên dewlemend di Aşer
de hebe û ew dê xwarinên bi tahm,
yên liyaqî qiralan e bighîne.
21 Naftalî mîna pezkûviyek ha-
tiye berdan e; ew gotinên xweşik
dibêje.
22 Ûsiv guliyek bi mêwe, li ber
çavkaniyê guliyek bi mêwe ye,
zîlên wî, ji ser dîwaran ve xwe ve-
dizîne[3]. 23 Û tîrvan, bêheyf anîn
êrîşî wî kirin û bi neyarî tîrên xwe
bi ser wî ve barand. 24 Lê belê
tîra wî zexm û milên wî û destên
wî vekêş derketin. Bi saya Xwe-
dayê xwurt, yê Aqûp, zinarê Îs-
raêl û Xwedayê ku Şivanê wî ye;
li wê derê ye. 25 Û yê ku alîka-
riyê bi te re dike, Xwedayê bavê
te yî û Xwedayê hêza wî têra her
tiştî dike yî, yê ku te pîroz dike.
Li jor, bi bereketa ezmanan, li jêr
jî, bi bereketa behran û bi bereke-
ta pêsîran û rehmê ew e yê ku te
pîroz dike. 26 Duayên bavê te yên
xêrê digihêje herî nuxtikên dûr,
yên çiyayên bê dawî û ji duayên
bapîrên min bilindtir e. Duayên
min dê li ser serê Ûsiv û li ser
serê yê ku di nava birayên xwe de
pêşeng e, bibin.
27 Benyamîn, mîna gurek birçî
ye; sibehê nêçîra xwe dixwe û
êvarî xenîmetê par dike.
28 Donzdeh eşîrên Îsraêlê vana
ne. Û gava bavê wan, wan pîroz
dikir, vana got. Her yekî bi şiklekî
li cîh pîroz kir.

1 Di nîjada wî de.
2 An jî: Baldirêjiyê li suxre dike.
3 Derbas dike.

*Mirina Aqûp*

29 Û ji wan re got û van emiran da wan: Ez li ber mirinê me, ez ê bigihêjim gelê xwe; min li welatê Kenanê, li cem bapîrên min li şikefta di zeviya Efronê Hîtitî de ye, ya ku nêzîkî Mamrê ye, 30 li şikefta ku li Maqpela ye binerd bikin. Birahîm wê şikefta, bona ku bike goristan, tevî zeviya wî ji Efronê Hîtitî ve stendibû. 31 Birahîm û jina wî Sara, Îshaq û jina wî Rebeka, li wir hatin binerd kirin. Û min Lêa li wir binerd kir. 32 Zevî û şikefta di hundirê wê de, ji lawên Het ve hate stendin.

33 Û gava Aqûp, emirên ku dida lawên xwe qedand, lingên xwe kişand hundirê livînê û bi dayîna hilma xwe yî dawîn, gîhaşt gelê xwe.

*Binerdkirina Aqûp*

1.Mûs 47,28-31; 49,29-33

50 Û Ûsiv xwe avêt ser bavê xwe û bi girî kirinê, wî ramûsand. 2 Û bona ku cesedê bavê wî şima bikin Ûsiv emir da hekîmên xwe yî taybetî. Û hekiman, Îsraêl bi şima kirin. 3 Û ev kar, çil roj domiya. Ji ber ku bona şima kirinê, ev dem hewce dikir. Û Misiriyan bona wî, heftê roj şînê girtin.

4 Û gava rojên şînê qediyan Ûsiv ji maliyên Fîrawûn re got: Ger di çavê we de xêrê dîtibim, ji kerema xwe bi Fîrawûn re biaxifin. 5 Bavê min, sondê bi min da vexwarin: Ev e, ez li ber mirinê me, tuyê min li welatê Kenanê ve li gora ku bona xwe kolandime binerd bike got. Niha ji kerema xwe bigehînin Fîrawûn, bila destûrê bide ku ez herim, bavê xwe binerd bikim û werim.

6 Û Fîrawûn got: Here, bavê xwe binerd bike, sonda xwe bîne cîh.

7 Û bi vî awayî Ûsiv, bona binerd kirina bavê xwe çû. Û hemû wezîfedarên Fîrawûn û pêşhatiyên Misirê û qesrê jî pê re çûn. 8 Û hemûya malbata Ûsiv û birayên wî û maliyên bavê wî jî bi wî re bûn. Tenê zarok û ga û dewaran li bajarê Goşenê hiştin. 9 Û erebe û siwaran jî bi wî re çûn. Û komaleyek mezin ava kirin.

10 Û gava gîhaştin Bêndera Atadê ya ku li rojhilatê çemê Urdunê yî û li wê derê bi dengekî bilind qêriyan û lawijên bi êş gotin. Û wî bona bavê xwe, heft roj şînê girt. 11 Û Kenaniyên ku li wê herêmê dijiyan, gava şîna li Bêndera Atadê dîtin: Kesên Misirî çiqas bi keser şînê dikişînin! gotin. Bo vê yekê navê Abel-Mîsrayim[1] li vî cîhê ku li rojhilata çemê Urdunê ye kirin.

---

1 Avel-Misrayîm: Şîna Misiriyan, an jî: Mêrga Misiriyan.

12 Û lawên wî emrê ku bavê wan
dabû, bê kêmasî anîn cîh. 13 Û
lawên wî ew birin welatê Kenanê
û li şikefta ku di zeviya Maqpela
ya ku nêzîkî Mamrê ye de binerd
kirin. Birahîm wê şikeftê, bona ku
bike goristan, tevî zeviyê ji Efronê
Hîtitî ve stendibû. 14 Û Ûsiv, paşî
bavê xwe binerd kir, ew û birayên
wî û heçî kesên ku bona binerd
kirina bavê wî bi wî re hatibûn,
vegeriyan Misirê.

*Ûsiv Ewlekariyê dide Birayên xwe*

15 Û gava birayên Ûsiv mirina
bavê xwe dîtin, gotin: Dibe ku
Ûsiv girr û kînê bona me xwedî
dike, ya li hembera xerabiya ku
me bi wî kir, bixwaze ku tolê ji
me bistîne! 16 Û bi vî awayî, vê
nûçeya ji Ûsiv re şandin û gotin:
Berî ku bavê me bimire, emrê ji
Ûsiv re ûsa bibêjin dabû: 17 Bi-
rayên te xerabiyê bi te kirin, ji ke-
rema xwe niha li sûc û gunehên
wan biborîne! Û çi dibe, niha
gunehê me bibexşîne! Em qûlên
Xwedayê bavên te ne! Û gava
wan jê re gotin, Ûsiv giriya.
18 Û li ser vêya, birayên wî çûn û
li ber wî secde kirin û gotin: Em
qûlên te ne!
19 Û Ûsiv ji wan re got: Metirsin!
Ma ez di şuna Xwedê de me? 20 Û
hûn ji bo min bi xerabî fikirîn; lê
belê Xwedê mîna ku îro jî ûsa ye,
bona jiyana pirr gelan biparêze,
wê xerabiyê wergerand û kir qen-
cî. 21 Û niha hûn metirsin; ez ê we
û zarokên we xwedî bikim! Û wî
xemrevînî li wan kir û bi gotinên
xweşik bi wan re axifî.

*Mirina Ûsiv*

22 Û Ûsiv bi xwe û maliyên bavê
wî li Misirê bi cîh bûn. Û Ûsiv
sed û deh sal jiyana xwe domand.
23 Û Ûsiv sê nifşe ji zarokên
Efrayîm ve dît. Û zarokên Makîrê
lawê Manaşşe, li ser çongên Ûsiv
de hatin dinê.
24 Û Ûsiv ji birayên xwe re got:
Ez ê bimirim! Lê belê dê bi biryarî
Xwedê alîkariyê bi we bike û dê
we bibe erdên ku ji Birahîm û Îs-
haq û Aqûp re, bi sond xwarinê
soz dayiye. 25 Û Ûsiv sondê bi
lawên Îsraêl da xwarin û got: Dê
bi biryarî Xwedê alî we bike. Wê
çaxê hûn ê hestiyên min, ji vir ve
bibin!
26 Û Ûsiv, di sed û deh saliya xwe
de mir. Û wî bi şima kirin û li Mi-
sirê xistin tabûtekê.

# 2. MÛSA[1]

*Pêşgotin*

Pirtûka Ji Misirê Derketin; di derbarê Îsraêliyên ku dûr û nêzîk berî 3500 salî ji Misira ku lê kole bûn, cudabûyîna wan de ye. Mirov dikare pirtûkê mîna çar beşên bingeh cihê bike:

1. Ji dîlitiyê xelasiya Îsraêliyan.
2. Rêwîtiya ku berbi çiyayê Sînayê kirine.
3. Peymana ku Xwedê li çiyayê Sînayê bi gelê xwe re daniye. (Ev peyman, bi naveroka zagonên exlaqî û civakî ên ku ronahiyê bide jiyanê wan ve bû.)
4. Avakirin û raxistina cîhê peristinê. Ji Xwedê re peristin, zagonên di derbarê kahînan de.

Pirtûk berî her tiştî, qala kirinên Xwedê, yên ku bona gelê xwe ji dîlitiyê xelas bike û mîna neteweyek bi hêvî li hatina xwe binêre bike, dike.

Kesê ku di navenda pirtûkê de yî; Mûsayê ku Xwede bona gelê xwe ji Misirê derxîne, pêşengiyê bike bijartiye ye. Deh Emirên di birra 20'an de derbas dibe, mijarên pirtûkê yên herî qenc têne zanîn in.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-15:21 | Xelasiya Îsraêliyan ji Misirê |
| a.1:1-22 | Li Misirê koletî |
| b.2:1-4:31 | Bûyîna Mûsa û salên ciwaniya wî |
| c.5:1-11:10 | Mûsa û Harûn li dijî Fîrawûn radibin |
| ç.12:1-15:21 | Qurbanê Fisihê û ji Misirê derketin |
| 15:22-18:27 | Ji Çemê Gewez koçkirina Çiyayê Sînayê |
| 19:1-24:18 | Peymana ku li Çiyayê Sînayê hatiye danîn |
| 25:1-40:38 | Qaîdeyên peristina di çadira hevdîtinê de |

1 Derketin.

*Îsraêlî li Misirê zordariyê dibînin*

5.Mûs 26,5-6; K.Şa 7,18-19

1 Û navê lawên Îsraêl, yên ku
hatine Misirê ev in; her zilam
û maliyên wî tevî Aqûp hatin:
2 Rûben, Şîmeûn, Lêwî û Cihûda,
3 Îssakar, Zebûlûn û Benyamîn,
4 Dan û Naftalî, Gad û Aşer. 5 Û
hemû canên ku ji nîjada Aqûp ve
bûne heftê can bûn û jixwe Ûsiv
li Misirê bû.
6 Û Ûsiv û hemû birayên wî
û hemûya ew nifşeyê mirin.
7 Û lawên Îsraêl bi bereket bûn
û afirîn û zêde bûn û bi zêdeyî
xwurt bûn û welat bi wan ve hate
dagirtin.
8 Û qiralekî bi Ûsiv ve nizanî hate
serê Misirê. 9 Û ji neteweya xwe
re got: A vay, netewa lawên Îsraêl
ji me zêdetir û xwurttir in; 10 we-
rin, em bi wan re bi baqilî bikin,
ya na dê zêde bibin û dibe ku
dema şer derkeve, dê ew jî bi ne-
yarên me re yek bibin û li dijî me
şer bikin û ji welêt ve derkevin.
11 Û bona ku tevî barên wan tah-
dê li wan bikin; karmendên suxrê
danîn ser wan. Û bona Fîrawûn,
bajarên embaran yên Pîtom û
Ramses ava kirin. 12 Lê belê
her çiqasî tahdê li wan kirin, ew
ewqasî zêde bûn û ewqasî belav
bûn. Û ew ji ber lawên Îsraêl
ketin tirsê. 13 Û Misiriyan, bi
dijwarî lawên Îsraêl xebitandin!
14 Û di hemû karên xwe yên ku bi
dijwarî de dixebitandin, di zeviyê
bi her celeb karî de, di xerc û ker-
pîcê de, bi karê giran jiyana wan
tahl kirin.
15 Û qiralê Misirê ji pîrikên
Îbranî, yên ku navê yekê Şîfra û
ya din jî Pûa bû re axifî 16 û got:
Gava hûn bona pîrekên Îbranî
pîrikiyê bikin û dema we wan di
kursiya zayînê de dîtin, ger zaro-
kek law be, hûn ê wî bukujin; na,
ger qîz be, dê ew bijî. 17 Lê belê
pîrikan ji Xwedê ve ditirsiyan û li
gor ku qiralê Misirê ji wan re go-
tiye nekirin û zarokên law, bi saxî
hiştin. 18 Û qiralê Misirê bangî
pîrikan kir û ji wan re got: Çima
we vî tiştî kirin û zarokên law bi
saxî hiştin?
19 Û pîrikan ji Fîrawûn re go-
tin: Ji ber ku pîrekên Îbranî ne
mîna pîrekên Misirî ne; ji ber ku
ew zindî[1] ne û berî ku pîrik were
cem wan, ew dizên. 20 Û Xwedê
qenciyê bi pîrikan re kir û nete-
we zêde bû û bi zêdeyî xwurt bû.
21 Û wusa bû, ji ber ku pîrikan ji
Xwedê ve ditirsiyan, wî wan kirin
xwedî milk û mal. 22 Û Fîrawûn
emir da hemûya neteweya xwe û
got: Hûn ê her zarokê law yê ku
bibe, bavêjin çem[2]; lê belê her qî-
zikê bi saxî bihêlin!

1 Candar, an jî: Hêzdar in.

2 Nîl.

*Bûyîna Mûsa*

K.Şa 7,20-22; Îbr 11,23

2 Û ji mala Lêwî zilamek çû û
bi qîzekê Lêwî re zewicî[1]. 2 Û
pîrek ducanî ma û zarokek law anî
dinê û xweşikbûna wî dît û sê mehî
wî veşart. 3 Û gava êdî nikarîbû ku
wî veşêre, bo wî selikek ji kamiran
ve rahişt û bi xerc û ziftê ve sîwax
kir[2] û lawik xist hundirê wê û li
qeraxa çem danî hûndirê kamiran[3].
4 Û xwuşka wî; bona ku ka dê çi bi
wî ve bê, li dûr ve sekinî.
5 Û qîza Fîrawûn bona şuştinê
daket çem û qîzikên wê ji qera-
xa çem ve dimeşiyan û di nava
qamiran de sepetê dît û bona ku
wê bîne, cariya xwe şand. 6 Û wê
vekir û lawik dît û a vay, lawik di-
giriya. Û heyfa wê lê hat û got: Ev
yek ji zarokên Îbraniyan e.
7 Û Xwuşka wî, ji qîza Fîrawûn
re got: Ma ez bona te herim û ji
pîrekên Îbraniyan, bangî yekê bi
şîr bikim? Û ew ê bona te şîr bide
lawik.
8 Û qîza Fîrawûn ji wê re got:
Biçe û keçik çû bangî diya zarok
kir. 9 Û qîza Fîrawûn ji wê re got:
Vî lawikî rahêje û bona min şîr
bide wî û ez ê heqê te bidim te!
Û pîrekê lawik rahişt û şîr da wî.
10 Û lawik mezin bû û wê wî ji
qîza Fîrawûn re anî û bû lawê wê.
Û navê Mûsa lê kir û got: Ji ber ku
wî ji avê derxistim.

*Mûsa direve Midyanê*

K.Şa 7,23-29; Îbr 11,24-26

11 Û di wan rojan de wusa bû
ku; gava Mûsa mezin bû, rastî bi-
rayên xwe hat û barên wan dît û
dît ku yekî ji Misiriyan, li birayê
wî yê Îbranî dukute 12 û gava li
dora xwe nihêrt û dît ku kes nîne,
li yê Misirî xist[4] û wî di qûmê
de veşart. 13 Û roja din derket û
a vay, du kesên Îbranî pev re şer
dikirin; ji yê ku xerabiyê dike re
got: Çima tu li hevalê xwe dixî?
14 Lê belê wî[5] got: Ma gelo kî te
li ser me mîna serok û darazkirek
daniye? Gelo mîna ku te yê Misirî
kuştiye, tu dixwazî min jî bukujî?
Û Mûsa tirsiya û got: Bi rastî jî
ew kar hate zanîn.
15 Û gava Fîrawûn ev karî bihîst,
bo ku bukuje li Mûsa geriya. Lê
belê Mûsa ji ber Fîrawûn reviya û
li welatê Midyanê ma û li ser serê
bîrekê rûnişt.
16 Û heft qîzên kahînê Midyanê
hebûn û hatin û avê kişandin û
bona ku avdana keriyê bavê xwe
bikin, teştan dagirtin. 17 Û şivan
hatin û wan qewirandin; lê belê
Mûsa rabû û bona ku alîkariyê bi
wan re bike, avê da keriyên wan.

---

1 Qîzekê Lêwiyî girt.
2 Seyand.
3 Qamirgeh.
4 Li wî xist, an jî: Wî kuşt.
5 Yanê yê ku xerabiyê dikir, got.

18 Û gava hatin cem bavê xwe
Reûyel, wî got: Gelo çawa bû ku
hûn îro zû hatin? 19 Û gotin: Zi-
lamek Misirî me ji destên şivanan
xelas kirin û bona me avê kişand
û avdana keriyê[1] kir! 20 Û ji qîzên
xwe re got: Û ew li ku ye? Çima
we dev ji vî zilamî berdan? Hela
bangî wî bikin ku, bila nan bi-
xwe!
21 Û Mûsa bi wî zilamî re mayinê[2]
razî hat; wî jî qîza xwe Tsîppora
da Mûsa. 22 Û wê lawekî anî dinê
û wî navê Gerşom li wî kir; ji ber
ku: Ez li welatê biyaniyê xerîb
bûm got.
23 Lê belê piştî gellek rojan wusa
bû ku, qiralê Misirê mir û lawên
Îsraêl ji ber dîlitiya xwe naliyan
û qêriyan û ji ber dîlitiya wan,
qêrînên wan gîhaşt Xwedê. 24 Û
Xwedê nalînên wan bihîst û Xwe-
dê peymana xwe ya bi Birahîm,
Îshaq û Aqûp re kiriye anî bîra
xwe. 25 Û Xwedê lawên Îsraêl dît
û Xwedê bi wan re eleqedar bû.

*Xwedê bangî Mûsa dike*

K.Şa 7,30-34; 2.Mûs 6,2-8

3 Û Mûsa, keriyê xezûrê xwe
Yetro yê ku kahinê Midyanê
ye, dajot û keriyê bir paşî çolê û
hate çiyayê Xwedê Horebê. 2 Û
milyaketê XUDAN, di nava sinci-
kekê de di pêta agir de jê re xuyanî
bû û ew dît û a vay, sincik bi agir
ve dişewite û sinc nediqediya. 3 Û
Mûsa got: Ez niha vegerim û vê
dîmena mezin bibînim, gelo çima
sinc dişewite û naqede?
4 Û gava XUDAN dît ku bona
dîtinê nêzîk dibe, Xwedê ji nava
sincikê bangî wî kir û got: Mûsa!
Mûsa! Û ew: A vay, ez! got.
5 Û wî got: Nêzîkî vir nebe!
Çaroxên xwe ji lingên xwe ve
derxîne, ji ber, cîhê ku tu li ser
sekiniye, erdên pîroz in. 6 Û got:
Ez Xwedayê bavê te, Xwedayê
Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwe-
dayê Aqûp im. Û Mûsa wecê xwe
nuxumand; ji ber, ditirsiya ku li
Xwedê binêre.
7 Û XUDAN got: Bi rastî,
tengasiya netewa xwe yî li Misirê
ye dîtim û qêrînên wanî ji ber
karmendên suxrê ne, bihîstim; ji
ber ku ez bi êşên wan dizanim.
8 Û bona ku wan ji destên
Misiriyan xelas bikim û wan ji wî
warî, derxînim warekî qenc û fireh,
welatê ku şîr û hungiv diherike,
bona ku derxînim cîhê Kenanî
û Hîttî û Amorî û Perîzzî û Hîvî
û Yebûsiyan, daketim. 9 Û niha,
a vay, qêrîna lawên Îsraêl gihîşt
min û him jî tahda ku Misiriyan li
wan dikirin dîtim. 10 Û niha were

1 Miyan.
2 Bi wî re rûniştinê.

û bona ku tu qewma min, lawên
Îsraêl ji Misirê ve derxîne, ez te
bişînim cem Fîrawûn.
11 Û Mûsa ji Xwedê re got: Ma
ez kî me ku, herim cem Fîrawûn
û lawên Îsraêl ji Misirê ve derxî-
nim? 12 Û wî got: Bi rastî ez ê bi
te re bim û dê nîşana ku min te
şandiye ev be: Gava tu qewmê ji
Misirê ve derxînî, hûn ê li ser vî
çiya ji Xwedê re peristinê bikin.
13 Û Mûsa ji Xwedê re got: A
vay, gava ez biçim cem lawên Îs-
raêl û ji wan re bibêjim: Xwedayê
bapîrên we min ji we re şand û
ew jî ji min re: Gelo navê wî çî
ye? bibêjin, ma ez ê ji wan re çi
bibêjim?
14 Û Xwedê ji Mûsa re got: Ez,
YÊ KU EZ IM û got: Tuyê ji
lawên Îsraêl re wusa bibêje: EZ
IM, min ji we re şandiye.
15 Û dîsa Xwedê ji Mûsa re got:
Tuyê ji lawên Îsraêl re wusa bi-
bêje: XUDAN yê ku Xwedayê
bapîrên we, Xwedayê Birahîm,
Xwedayê Îshaq, Xwedayê Aqûp
e, min ji we re şandiye; abadîn
navê min ev e û ji deman heta de-
man bîranîna min ev e.
16 Here û kalepîrên Îsraêlê bicivî-
ne û ji wan re bibêje: XUDAN yê
ku Xwedayê bapîrên we, Xwedayê
Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwe-
dayê Aqûp e, ji min re xuyanî bû û
got: Bi rastî jî ez hatim serîdanka
we û li Misirê, tiştên ku li we tên
kirin dîtim 17 û gotim: Ez ê we ji
tengasiya Misirê, derxînim welatê
Kenanî û Hîttî û Amorî û Perîzzî û
Hîvî û Yebûsiyan, derxînim welatê
ku şîr û hungiv diherikin.
18 Û dê gotina te guhdarî bikin û
tu û kalepîrê Îsraêlê, hûn ê werin
qiralê Misirê û ji wî re bibêjin:
XUDAN yê ku Xwedayê Îbra-
niyan e, rastî me hat û em niha
rica dikin, di çolê de em qasî sê
rojî rê biçin, da ku, ji Xwedayê
xwe XUDAN re qurbanê serjê-
bikin. 19 Û ez dizanim ku qiralê
Misirê, ger bi destekî xwurt be jî,
dê bona çûnê destûrê nede we.
20 Û ez ê destê xwe dirêj bikim
û bi hemû nuwazeyên ku ez ê tê
de çêbikim, li Misirê bixim û dê
paşî wê we berde.
21 Û ez ê di çavê Misiriyan de,
xêrê bidim vê netewê û dê ûsa
bibe ku dema hûn biçin, hûn ê
destvala neçin; 22 lê belê dê her
pîrek ji cîranê xwe û ji mêvanên
ku di mala wê de ne tiştên zîv û
tiştên zêr û kincan bixwaze û hûn
ê lawên xwe û qîzên xwe bi wana
ve bixemilînin û hûn ê Misiriyan
bişelînin[1].

*Xwedê Elametan nîşanî Mûsa dide*

Yêr 1,4-9

4 Û Mûsa bersivê da û got: Lê
belê a vay, dê bi min bawer

1 Tazî bikin.

nebin û gotina min guhdarî ne-
kin; ji ber ku dê: XUDAN ji te re
xuyanî nebûye bibêjin.
2 Û XUDAN ji wî re got: Ev tiştê
ku di destê de ye çî ye? Û wî got:
Ço. 3 Û wî got: Wê bavêje erdê.
Û wî wê avêt erdê û ew bû mar û
Mûsa ji ber wê reviya. 4 Û XU-
DAN ji Mûsa re got: Destê xwe
dirêj bike û wî ji doça wî ve bigire.
Û destê xwe dirêj kir û bi wî girt
û ew di destê wî de bû ço. 5 Da
ku, bila bawer bibin, XUDAN,
Xwedayê bapîrên te, Xwedayê Bi-
rahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê
Aqûp, xwe nîşanî te kiriye.
6 Û dîsa XUDAN ji wî re got: Niha
destê xwe têxe nav sînga xwe. Û
destê xwe xiste nav sînga xwe û
gava destê xwe derxist, a vay, destê
wî mîna berfê bi cizam[1] bûbû.
7 Û got: Destê xwe dîsa têxe nav
sînga xwe. Û destê xwe dîsa xiste
nav sînga xwe û gava wî jê der-
xist, a vay, dîsa bû mîna goştê wî.
8 Û dê ûsa bibe ku, ger bi te ba-
wer nebin û gotina nîşana pêşiyê
guhdarî nekin, dê bi gotina nîşana
dawiyê bawer bibin. 9 Û dê ûsa
bibe ku, ger bi van her du nîşanan
jî bawer nebin û gotina te jî guh-
darî nekin, tuyê ji ava çem rahêje
û birijîne erda reşiyê û ava ku te ji
çem ve rahiştiye, dê di reşiyê de
bibe xwîn.
10 Û Mûsa ji XUDAN re got:
Eman, ya Xudan! Ez ne doh, ne
roja pêr, ne jî ji dema ku te ji qûlê
xwe re gotiye, ne zilamê gotinê
me; ji ber ku ez zilamek devgiran
û zimangiran im.
11 Û XUDAN jê re got: Ma kî
devê mirov çêkir? Ma yê ku mi-
rov lal an jî kerr, an dibîne an jî
kor dike kî ye? Ma ne ez XUDAN
im? 12 Û niha here û ez ê tevî
devê te bibim û tiştê ku tu bibêjî,
ez ê hînî te bikim.
13 Û got: Eman, ya Xudan! Ez
rica dikim[2]. Bi destê zilamê ku
tuyê bişînî, bişîne.
14 Û XUDAN li dijî Mûsa hêrs bû
û got: Ma birayê te Harûnê Lêwi-
yî nîne? Ez dizanim ku ew qenc
dibêje. Him jî a vay, ew bona pêr-
gîniya te derdikeve û gava te bibî-
ne, dê dilê wî şa bibe. 15 Û tuyê jê
re bibêje û tuyê gotinan têxe devê
wî û ez ê tevî devê te û tevî devê
wî bibim û tiştên ku hûn ê çêkin,
ez ê hînî we bikim. 16 Û ew ê
bona te ji qewmê re bibêje: Û dê
ûsa bibe ku, ew ê bona te bibe dev
û tuyê bona wî, bibe mîna Xwedê.
17 Û tuyê vî çoyê ku pê re ela-
metan bike, bigire destê xwe.

*Mûsa vedigere Misirê*

18 Û Mûsa çû û vegeriya cem xe-
zûrê xwe Yetro û jê re got: Ez rica

1 Kotî.

2 Ez lava dikim, an jî: Ez hewînê dikim.

dikim, ez herim û vegerim cem bi-
rayên xwe yên ku li Misirê ne û bi-
bînim ku hela ew hîn dijîn û Yetro ji
Mûsa re: Bi dilxweşiyê here! got.
19 Û di Midyanê de XUDAN ji
Mûsa re got: Here, vegere Misirê;
ji ber ku hemû zilamên ku li canê
te digeriyan mirin! 20 Û Mûsa
pîreka xwe û zarokên xwe rahişt û
wan li ser kerê siwar kirin û vege-
riya welatê Misirê û Mûsa, çoyê
Xwedê di destê xwe de bir.
21 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Gava tu vegere û here Misirê,
bala xwe bide ku hemû nuwa-
zeyên ku dame te, li ber Fîrawûn
çêke; lê belê ez ê dilê wî hişk
bikim û dê netewê bernede. 22 Û
tuyê ji Fîrawûn re bêje: XUDAN
wusa dibêje: Îsraêl, lawê min, yê
minî pêşîn e 23 û ji te re gotim:
Lawê min berde ku, bila ji min re
peristinê bike! û te nexwest ku wî
bişînî. A vay, ez ê lawê te, yê te yî
pêşiyê bukujim!
24 Û di rê de, di qonaxê de ûsa
bû ku, XUDAN rastî wî hat û
xwest ku wî bukuje. 25 Û Tsîp-
pora kevirekî tuj rahişt û çermikê
ser lebatê lawê xwe jê kir[1] û wî
avêt bin lingên wî û got: Bi rastî
tu ji min re zavayê xwînê yî!
26 Û XUDAN wê berda. Wê gavê
pîrek: Ji sedema sunetê, tu zavayê
xwînê yî got.
27 Û XUDAN ji Harûn re got:
Bona pêrgîniya Mûsa, here çolê.
Û çû û di çiyayê Xwedê de rastî
wî hat û wî ramûsand. 28 Û Mûsa,
hemû gotinên ku XUDAN bi wî
re şandine û hemû elametên ku
emrê wan dane ji Harûn re got.
29 Û Mûsa û Harûn çûn û hemû ka-
lepîrên lawên Îsraêl civandin 30 û
Harûn, hemû gotinên ku XUDAN
ji Mûsa re gotibû, got û li ber çavên
netewê elametan çêkir. 31 Û ne-
tewe bawer bû û dema bihîstin ku
XUDAN serîdanka lawên Îsraêl ki-
riye û tengasiyên wan dîtine, serên
xwe xwar kirin û secde kirin.

*Mûsa û Harûn di hizûra Fîrawûn de*

2.Mûs 3,18-19

5 Û paşê Mûsa û Harûn hatin û
ji Fîrawûn re gotin: Xwedayê
Îsraêlê XUDAN, wusa dibêje:
Gelê min berde, ku bila di çolê de
ji min re cejnê bikin!
2 Û Fîrawûn got: XUDAN kî ye
ku, ez bona berdana Îsraêlê go-
tinên wî guhdarî bikim? Ez XU-
DAN nas nakim û Îsraêl jî berna-
dim!
3 Û gotin: Xwedayê Îbraniyan
rastî me hat; em rica dikin, di çolê
de rêyekî sê rojî herin û bona ku
bi nexweşiyê[2], an jî bi şûr li me
nexe, em ji Xwedayê xwe XU-
DAN re qurbanê serjê bikin!

1 Yanê wî sunet kir.

2 Weba.

4 Û qiralê Misirê ji wan re got:
Ya Mûsa û Harûn, çima hûn ne-
tewê ji karên wê disekinînin? He-
rin barên xwe! 5 Û Fîrawûn got:
A vay, niha neteweyê welêt zêde
ne û hûn wan ji karên wan didin
sekinandin!
6 Û Fîrawûn, wê rojê ji suxre-
vanên netewê û ji karmendên wê
re emir kir û got: 7 Çawa ku heta
niha, bona kerpîç çêkirinê mîna
we ka didan netewê, êdî nedinê;
bila ew ji xwe re herin û ji xwe re
kayê bidin hev. 8 Û hûn ê hejmara
kerpîçên ku heta niha çêdikirin,
daynin ser wan; ji wê kêmtir ne-
kin, ji ber ku ew teral in; bo wê
bi gotina: Em herin û ji Xwedayê
xwe re qurbanê serjê bikin! di-
qêrin. 9 Bila karên hîn jî giran li
ser zilaman bên danîn, da ku, di
wî karî de bixebitin û gotinên de-
rewîn guhdarî nekin!
10 Û suxrevanên qewmê û kar-
mendên wan derketin û ji netewê re
gotin û têgîhandin: Fîrawûn wusa
dibêje: Ez kayê nadim we. 11 Hûn
herin, ji cîhê ku we dîtine bona xwe
kayê bigirin; ji ber ku dê ji karên
we tu tiştek neyê kêm kirin.
12 Û netewe, bona ku ji bo kayê
firêze berhev bikin, li hemûya
welatê Misirê belav bûn. 13 Û
suxrevan jî bi gotina: Mîna dema
ku ka hebû, karên xwe, wezîfeyên
xwe yên rojane biqedînin! tahdê
li wan dikirin. 14 Karmendên ji
lawên Îsraêl bûn, yên ku ji aliyê
suxrevanên Fîrawûn ve li ser wan
hatine wezîfedar kirin, bi gotina:
Çima we doh û îro di kerpîç çêki-
rinê de wezîfa xwe neqedandin?
hatin kutandin.
15 Û karmendên ku ji lawên Îsraêl
bûn hatin û ji Fîrawûn re qêriyan
û gotin: Ma çima tu li qûlên xwe
wusa dikî? 16 Kayê nadin qûlên te
û ji me re dibêjin: Kerpîç çêbikin!
Û a vay, qûlên te tên kutandin û
sûc, ya qewma te ye!
17 Û wî got: Hûn teral in, teral! bo
wê: Ka em herin û ji XUDAN re
qurbanê serjê bikin! dibêjin. 18 Û
niha herin û bixebitin! Û dê ka jî
ji we re neyê dayîn, lê belê hûn ê
hejmara kerpîçan bidin.
19 Û karmendên lawên Îsraêl
dîtin ku, gava ji wan re: Divê hûn
ji kerpîçên xwe û ji wezîfeya xwe
yî rojane tiştekî kêm nekin! hate
gotin, rewşa wan xerab e. 20 Û
gava ew ji cem Fîrawûn derke-
tin, rastî Mûsa û Harûnê ku di rê
de sekinîne hatin 21 û ji wan re
gotin: Bila XUDAN we bibîne û
daraz bike; ji ber ku hûn, bona ku
me bukujin û bona ku şûrekê bide
destên wan, me di çavên Fîrawûn
û qûlên wî de mekrûh kirin.

*Xwedê soza Xelasiyê dide*

22 Û Mûsa zivirî XUDAN û got:
Ya Xudan, çima te muamela xe-
rab bi vî gelî re kir? Çima te min

şand? 23 Ji ber, cergî ku ez hatime
û bi navê te ji Fîrawûn re gotime,
muamela xerab ji vî gelî re kirin
û te tu carî netewa xwe xelas ne-
kirin.

6 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Tuyê niha yên ku ez ê li
Fîrawûn re bikim bibînî; ji ber ku
dê bi destê biqudret wan berde û
bi destê biqudret wan ji welatê
xwe ve biqewirîne.
2 Û Xwedê bi Mûsa re axifî û
jê re got: Ez XUDAN im 3 û ez
mîna Xwedayê ku Şiyandar[1] e ji
Birahîm, Îshaq û Aqûp re xwe
xuya kirim; lê belê ez bi navê xwe
yî XUDAN ji wan re malûm ne-
bûm. 4 Û welatê Kenanê, welatên
biyaniyê, yên ku tê de xerîb in,
bona ku bidim wan, bi wan re jî
peymanê danîm. 5 Û nalîna lawên
Îsraêl, yên ku Misirî wan di dîliti-
yê de digirin jî bihîstim û peyma-
na xwe di bîra xwe de anîm. 6 Bo
vê yekê, ji lawên Îsraêl re bibêje:
Ez XUDAN im û ez ê we ji bin
barên Misiriyan ve derxînim û we
ji hêsîriya wan ve xelas bikim û
we bi baskê[2] dirêjbûyî û bi darazi-
yên mezin ve azad bikim. 7 Û ez ê
we ji xwe re bikim netewe û ji we
re bibim Xwedê û hûn ê bizanibin
ku Xwedayê we, XUDAN, yê ku
we ji bin barên Misiriyan ve der-
xistine ez im. 8 Û ez ê we bînim
welatê ku bona dayîna wê, ku bi-
dim Birahîm, Îshaq û Aqûp, son-
dê xwaribûm û ez ê wê bi mêrasî
bidim we; ez XUDAN im.
9 Û Mûsa bi vî awayî ji lawên Îs-
raêl re got; lê belê ji ber tengasiya
can û hêsîriyê Mûsa guhdarî ne-
kirin.
10 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 11 Here, têkeve cem qiralê
Misirê Fîrawûn û jê re bêje ku
bila lawên Îsraêl ji welatê xwe ve
berde.
12 Û Mûsa li ber XUDAN axifî û
got: A vay, lawên Îsraêl min guh-
darî nekirin; ma dê Fîrawûn çawa
min guhdarî bike? Û ez zilamekî
lêvên wî bêsunet im[3].
13 Û XUDAN ji Mûsa û Harûn
re axifî û bona ku lawên Îsraêl
ji welatê Misirê derxînin, bona
lawên Îsraêl û qiralê Misirê
Fîrawûn emir da wan.

*Peyirka Nîjada Mûsa û Harûn*

1.Mûs 46,8-11; 4.Mûs 26,5-14; 26,57-62

14 Serokên malên bapîrên wan ev
in: Lawên Rûben, yê ku lawê Îsraêl
yê pêşîn bû: Henox û Pallû, Hets-
ron û Karmî; eşîrên Rûben ev in.
15 Û lawên Şimeûn: Yêmûyel û
Yamîn û Ohad û Yakîn û Tsohar û

---

1 Xwedayê ku Hêza xwe têra her tiştî dike, an jî: Xwedayê xwedî qudretbûnê ye, (yê qadir).

2 Mil, çepil.

3 Di maneya, ez zilamekî ûsa me ku nikarim gotinên xweş bibêjim de ye.

Şaûlê ku lawê pîrekek Kenanî bû;
eşîrên Şîmeûn ev in.
16 Navê lawên Lêwî, li gor bûyî-
na wan ev in: Gerşon û Kohat û
Merarî û salên jiyana Lêwî sed û
sîh û heft sal bûn.
17 Lawên Gerşon li gor eşîrên
wan: Lîbnî û Şîmeyî ne.
18 Û lawên Kohat: Amram û Yît-
sar û Hebron û Ûzzîel û salên ji-
yana Kohat sed û sîh û sê sal bûn.
19 Û lawên Merrarî: Mahlî û
Mûşî ne. Li gor bûyîna wan,
eşîrên Lêwî ev in.
20 Û Amram, xwuşka bavê xwe
Yokebedê bi jinî ji xwe re anî û
wê jê re Mûsa û Harûn anîn dinê
û salên jiyana Amram sed û sîh û
heft sal bûn.
21 Û lawên Yîtshar: Korah û Ne-
feg û Zikrî ne. 22 Û lawên Ûzzîel:
Mîşayel û Eltsafan û Sîtrî ne.
23 Û Harûn ji xwe re Elîşeba ya
ku qîza Ammînadaba ku xwuşka
Naşon e bi jinî anî[1] û wê jê re
Nadab û Abîhû, Eleâzêr û Îtamar
anîn dinê.
24 Û lawên Korah: Assîr û Elkana
û Abîasaf; eşîrên Korahiyan ev in.
25 Û Eleâzêrê lawê Harûn ji xwe
re ji qîzên Pûtîel jinekê anî û jê re
Pînehas anî dinê. Li gor eşîrên wan
serokên bavên Lêwiyiyan ev in.
26 Harûn û Mûsayê ku XUDAN
ji wan re: Lawên Îsraêl, li gor
artêşên wan, ji Misirê ve derxînin
gotibû, ev in. 27 Yên, bona ku
lawên Îsraêl ji Misirê ve derxînin
ji qiralê Misirê Fîrawûn re gotibûn
ev in; ew Mûsa û Harûn ev in.

*Xudan emir dide Mûsa û Harûn*

28 Û wusa bû ku, di roja XU-
DAN li welatê Misirê de, ji Mûsa
re têgîhand; XUDAN bi Mûsa re
axifî û got: 29 Ez XUDAN im;
her tiştên ku ji te re gotime, ji qi-
ralê Misirê Fîrawûn re bibêje.
30 Û Mûsa, li ber XUDAN got:
A vay, ez zilamek, lêvên wî bêsu-
net im û ma dê Fîrawûn çawa min
guhdarî bike?

7 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Binêre, min te ji Fîrawûn re kir
mîna Xwedê û dê birayê te Harûn
bibe peyxamberê te. 2 Tuyê her
tiştên ku ji te re emir kirime bibêje
û dê birayê te Harûn ji Fîrawûn re
bibêje; da ku, lawên Îsraêl ji welatê
xwe berde. 3 Û ez ê dilê Fîrawûn
hişk bikim û elamet û nuwazeyên
xwe li welatê Misirê zêde bikim.
4 Lê belê dê Fîrawûn we guhdarî
neke û ez ê destê xwe deynim ser
Misirê û ez ê artêşên xwe, nete-
weya xwe lawên Îsraêl, bi darazi-
yên mezin ji welatê Misirê ve der-
xînim. 5 Û dema ez destê xwe bi
ser Misirê ve dirêj bikim û lawên
Îsraêl ji nav wan derxînim, dê Mi-
sir bizanibe ku XUDAN ez im.

1 Pê re zewicî.

6 Û Mûsa û Harûn wusa ki-
rin; mîna ku XUDAN ji wan re
emir kiribû ûsa kirin. 7 Û gava ji
Fîrawûn re gotin Mûsa heyştê salî
û Harûn jî heyştê û sê salî bûn.

*Çoyê Harûn dibe Mar*

8 Û XUDAN bi Mûsa û Harûn re
axifî û got: 9 Gava Fîrawûn ji we
ve bixwaze ku hûn nuwazeyekî
nîşanî wî bidin, tuyê ji Harûn re
bibêje: Çoyê xwe hilde û bona ku
bibe mar, bavêje ber Fîrawûn.
10 Û Mûsa û Harûn ketin cem
Fîrawûn û mîna ku XUDAN emir
kiribû, wusa kirin û Harûn çoyê
xwe, li ber çavên qûlên wî avêt
ber Fîrawûn, erdê û bû mar. 11 Û
Fîrawûn jî bangî zilamên zaniyar
û afsunkaran kir û sêrbazên Mi-
sirê, wan jî bi sêhêrên xwe wusa
kirin. 12 Û her yekî çoyê xwe
avêtin û bûn mar û çoyê Harûn,
çoyên wan daqurtand. 13 Û mîna
ku XUDAN gotibû dilê Fîrawûn
hişk bû û ew guhdarî nekirin.

*Asîwa Xwînê*

Zeb 105,26-27.29; 78,44;
Pey 8,8-9; 16,3-6

14 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Dilê Fîrawûn bi inyad e, berdana
netewê naxwaze. 15 Sibehê here
cem Fîrawûn; a vay, ew diçe avê
û tuyê bona ku pêrgîgniyê jê re
bikî li qeraxa çem ve bisekine û
çoyê ku bi mar ve duguhere bi-
gire destê xwe. 16 Û tuyê jê re
bibêje: Xwedayê Îbraniyan XU-
DAN, ji bo ku di çolê de bi min
ve biperistin netewa min berde
min ji te re şand û a vay, te heta
niha guhdarî nekir. 17 XUDAN
ûsa dibêje: Tuyê bi vêya bizanibe
ku ez XUDAN im. A vay, ez ê bi
çoya ku di destê min de ye, li ava
ku di çem de ye bixim û dê ew
bizivirin xwînê. 18 Û masiyên ku
di çem de ne, dê bimirin û dê çem
genî bibe û dê Misirî bikerihin ku
ji çem ve avê vexwin.
19 Û XUDAN ji Mûsa re got: Ji
Harûn re bibêje, çoya xwe bigire
û destê xwe bi ser avên Misirê li
ser çemên wê, li ser qenalên wê,
li ser burkên wê û li ser hemû
cihokên avê ve dirêj bike ku bila
bibin xwîn û dê di hemûya welatê
Misirê de divê him di feraxên
darînî û him jî di yên kevirî de
xwîn bibe.
20 Û Mûsa û Harûn, mîna ku XU-
DAN emir dabû, wusa kirin û li
ber çavê Fîrawûn û li ber çavên
qûlên wî darê xwe hilda û li avên
ku di çem de ne xist û hemûya
avên ku di çem de ne, zivirîn
xwînê. 21 Û masiyên ku di çem
de bûn mirin û çem gennî bû û
Misiriyan êdî nikarîbûn ku ji çem
avê vexwin û li hemûya welatê
Misirê xwîn hebû.
22 Û sêrbazên Misirê bi sêhrên
xwe wusa kirin û mîna ku XUDAN

gotibû, dilê Fîrawûn hişk bû û wan
guhdarî nekirin. 23 Û Fîrawûn zi-
virî û ket mala xwe û qet guh jî
neda vêya. 24 Û hemûyên Misirî,
bona ava vexwarinê dora çem ko-
lan; ji ber ku nikarîbûn ava çem
vexwarana. 25 Û paşî ku XUDAN
li çem xist, heft roj tijî bûn.

*Asîwa Beqan*

Zeb 78,45; 105,30; Pey 16,13

8 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Bikeve cem Fîrawûn û jê re
bibêje: XUDAN wusa dibêje: Ne-
tewa min berde ku bila peristinê ji
min re bikin! 2 Û ger tu nexwaze
ku berde, a vay, ez ê bi beqan li
hemûya sînorên te bixim. 3 Û dê
çem bi beqan ve tijî bibe û bikele
û dê derkevin û dê bikevin mala te
û oda te ya raketinê û ser livînên
te û mala qûlên te û neteweya te
û firneyên te û teştên hevîran 4 û
dê beq derkevin ser te û netewa te
û hemûya qûlên te. 5 Û XUDAN
ji Mûsa re got: Ji Harûn re bibêje:
Destê xwe bi çoyê xwe dirêjî ser
çeman û qenalan û birkan bike û li
ser welatê Misirê ve beqan derxîne.
6 Û Harûn destê xwe dirêjî ser avên
Misirê kir û beq derketin û welatê
Misirê dagirtin. 7 Û sêrbazan bi
sêhêrên xwe wusa kirin û beqan
derxistin bi ser welatê Misirê ve.
8 Û Fîrawûn bangî Mûsa û Harûn
kir û got: Li ber XUDAN bige-
rin ku bila beqan ji min û netewa
min rake û ez ê bona ku netewa wî
qurbanan serjêbikin wan serbest
berdim. 9 Û Mûsa ji Fîrawûn re
got: Tu kerem bike; gelo ez bona
ku beq ji te û malên te qut bibin û
tenê di çem de bimînin, bo te û bo
qûlên te û bo gelê te kengê li ber
bigerim? 10 Û wî got: Sibê. Û wî
(Mûsa) got: Bila li gor gotina te
bibe, da ku tu bizanibe ku mîna
Xwedayê me XUDAN nîne. 11 Û
dê beq ji te û malên te û ji qûlên
te û netewa te rabin; tenê di çem
de bimînin. 12 Û Mûsa û Harûn
ji cem Fîrawûn derketin û Mûsa
ji ber beqên ku bi ser Fîrawûn ve
anîbû, feryadê ji XUDAN re kir. 13
XUDAN jî li gor gotina Mûsa kir û
beq di mal û hewş û zeviyan de mi-
rin. 14 Û wan kom bi kom berhev
kirin û welat gennî bû. 15 Lê belê
Fîrawûn dît ku sekinek çê bû, mîna
ku XUDAN gotibû dilê xwe hişk
kir. Û wan guhdarî nekir.

*Asîwa Kelmêşan*

Zeb 105,31

16 Û XUDAN ji Mûsa re got: Ji
Harûn re bibêje: Çoyê xwe dirêj
bike û li toza erdê bixe, da ku,
bila di hemûya welatê Misirê de
kelmêş bibe. 17 Û wusa kirin û
Harûn destê xwe bi çoyê xwe ve
dirêj kir û li toza erdê ve xist, di
mirov û heywan de kelmêş he-
bûn û li hemûya welatê Misirê de
hemû toza erdê bû kelmêş. 18 Û

yên sêrbaz, bona ku kelmêşan der-
xînin sêhrên xwe wusa çêkirin, lê
belê bi ser ve neketin û di mirov
de û di heywan de kelmêş hebûn.
19 Û sêrbazan ji Fîrawûn re gotin:
Ev tilîka Xwedê ye! Lê belê mîna
ku XUDAN gotibû dilê Fîrawûn
hişk bû û wan guhdarî nekir.

*Asîwa Kermêşan*

Zeb 78,45; 105,31

20 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Sibehê zû rabe û li ber Fîrawûn
bisekine; a vay, ew bona avê der-
dikeve û jê re bibêje: XUDAN
wusa dibêje: Netewa min berde
ku bila peristinê ji min re bike!
21 Ya na, ger tu netewa min
bernede, a vay, ez ê kermêşan bi
ser te ve û bi ser qûlên te ve û bi
ser netewa te ve û ji hundirê xa-
niyên te re bişînim û dê xaniyên
Misiriyan û erdên ku li ser in jî, bi
kermêşan ve tijî bibe. 22 Û ez ê di
wê rojê de, welatê Goşenê ya ku
netewa min tê de rûdinin, bona ku
li wir kermêşan nebin, cihê bikim;
da ku, tu di nava dinê de bizani-
be ku XUDAN ez im. 23 Û ez ê
ferqiyê têxim nava netewa xwe û
netewa te; dê sibê ev elamet bibe.
24 Û zehf kermêş hatin ser mala
Fîrawûn û ser malên qûlên wî û
ji ber kermêşan di hemûya welatê
Misirê de welat wêran bû.
25 Û Fîrawûn bangî Mûsa û
Harûn kir û got: Herin, ji Xwe-
dayê xwe re qurbanê serjê bikin.
26 Û Mûsa got: Ûsa kirin ne li cîh
e, ji ber ku em yên ku Misirî wan
mekrûh dihesibînin ji Xwedayê
xwe XUDAN re qurban bidin;
a vay, ma ger em yên ku Misirî
mekrûh dihesibînin li ber çavên
wan, bi qurbanî serjê bikin, dê
qey me nericimînin? 27 Em ê di
çolê de rêyekî sê rojî herin û ji
Xwedayê xwe XUDAN re, mîna
ku ji me re emir bike, qurbanan
serjê bikin. 28 Û Fîrawûn got:
Ez ê we berdim û hûn ê li çolê ji
Xwedayê xwe XUDAN re qur-
banê serjê bikin; lê belê divê hûn
pirr bi dûr ve neçin, bona min
lava bikin! 29 Û Mûsa got: A vay,
ez ji cem te derdikevim û bona ku
kermêşan ji ser Fîrawûn û ji ser
gelê wî û ji ser netewa wî rake, ez
ê li ber XUDAN bigerim; lê belê
tenê bila Fîrawûn carekî din bona
ji XUDAN re qurban serjêbikin
netewê berde, bi fenekiyê neke!
30 Û Mûsa ji hizûra Fîrawûn der-
ket û li ber XUDAN geriya. 31 Û
XUDAN li gor soza Mûsa kir û ji
ser Fîrawûn, qûlên wî û netewa wî
kermêşan rakir, yek tenê jî nema.
32 Û vê carê jî dilê Fîrawûn hişk
kir û qewmê berneda.

*Mirina Heywanan*

Zeb 78,48; Male 3,18

9 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Here cem Fîrawûn û jê re bi-

bêje: Xwedayê Îbraniyan XUDAN
wusa dibêje: Netewa min berde ku
bila peristinê ji min re bikin! 2 Ya
na, ger tu nexwaze ku wan berde
û tu hîn jî wan bisekinîne, 3 a vay,
destê XUDAN, dê li ser heywanên
li beyara, li ser hespan, li ser ke-
ran, li ser deveyan, li ser dewaran
û li ser mîhan be; dê şikestinek
gellekî giran çêbibe. 4 Û dê XU-
DAN cihêtiyê têxe nav heywanên
Îsraêl û heywanên Misiriyan û dê
ji hemûyên ku aidî lawên Îsraêl
in, tiştek jî nemire. 5 Û XUDAN
dema diyarkirî bijart û got: Dê
XUDAN ev tiştî, sibê di welêt de
çêbike. 6 Û XUDAN, roja din ev
tiştî çêkir û hemû heywanên Mi-
siriyan mirin; lê belê yek jî ji hey-
wanên lawên Îsraêl nemirin. 7 Û
Fîrawûn zilam şand û a vay, tenê
yek jî ji heywanên Îsraêl ve nemi-
ribû. Lê belê dilê Fîrawûn bi inyad
bû û qewmê berneda.

*Asîwa Kunêran*

Zeb 78,50; 5.Mûs 28,27; Pey 16,2

8 Û XUDAN ji Mûsa û Harûn re
got: Qasî ku kulmên we bigirin,
xweliya tifikê bigirin cem xwe û
bila Mûsa li ber çavên Fîrawûn,
ber bi ezman ve bavêje[1]. 9 Û dê ew
li ser hemûya welatê Misirê bibe
tozekî zirav û dê li hemûya welatê
Misirê, li ser mirov û heywan de
nêm derkevin û bibin kunêr.
10 Û xweliya tifikê rahiştin û li ber
Fîrawûn sekinîn û Mûsa wê berbi
ezman ve dawişand û di mirov
de û di heywan de bû kunêra ku
nêmê derdixîne. 11 Û sêrbaz, ji ber
kunêrê hêz neanîn ku li ber Mûsa
bisekinin; ji ber ku di sêrbazan û di
hemûya Misiriyan de kunêr hebûn.
12 Û XUDAN dilê Fîrawûn hişk
kir û mîna ku XUDAN ji Mûsa re
gotibû, wan guhdarî nekir.

*Asîwa Zîpikan*

Zeb 78,47-48; 105,32-33; Pey 8,7; 16,21

13 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Sibehê zû rabe û li ber Fîrawûn
bisekine û jê re bibêje: Xwedayê
Îbraniyan XUDAN wusa dibêje:
Netewa min berde ku bila peris-
tinê ji min re bikin! 14 Ji ber, bona
ku tu bizanibe di hemûya dinê de
mîna min nîne, îcar, ez ê ji dilê te
re û ji qûlên te û ji neteweya te re
hemûyên belayên xwe bişînim.
15 Ji ber ku, ger niha destê xwe
dirêj kiribûma û bi nexweşiyê[2] li
te û qewmê te xistibama, tuyê jî ji
erdê ve hatibûya birrîn; 16 lê belê
bi rastî jî bona vêya, bona ku navê
min di hemûya dinê de bê belav
kirin[3], bona ku qudreta xwe di te de
nîşan bidim, ez te dam sekinandin.

---

1 Yanê ba bike.
2 Weba.
3 Îlan kirin.

17 Gelo tu hîn bona ku netewa
min bernede, xwe li hemberî
wan bilindtir dikî? 18 A vay, ez ê
sibê ber bi vî wextî zîpikek giran,
ya ûsa ku, ji avabûna wê heta
niha li Misirê mîna wê nebariye
bibarînim. 19 Û niha heywanên
xwe û li beyarê her tiştên ku aidî
te ne birevîne; ji ber ku hemû
mirov û heywanên li beyarê ne,
ger nebin xaniyan dê zîpik dakeve
ser wan û dê bimirin. 20 Di nava
qûlên Fîrawûn de, yên ku ji gotina
XUDAN ve tirsiyan qûlên xwe û
heywanên xwe revandin xaniyan
21 û yên ku guh nedan gotina
XUDAN jî qûl û heywanên xwe,
di zeviyê de hiştin.
22 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Destê xwe ber bi ezman ve dirêj
bike, bila di hemûya welatê
Misirê de li ser mirov û heywan
û li ser hemû beyar û hemû
gîhayên li welatê Misirê ne zîpik
bibarin. 23 Û Mûsa çoyê xwe ber
bi ezman ve dirêj kir û XUDAN,
gurmîniyên ezman û zîpik şandin
û agir daket erdê û XUDAN, li ser
welatê Misirê ve zîpik barandin.
24 Bi vî awayî, zîpikek zehf giran
hebû û agir tevî zîpikê bûbû, cergî
bûne gelek[1], li hemûya welatê
Misirê ya wek wê nebûbû. 25 Û
zîpik li hemûya welatê Misirê,
ji mirov heta heywan, her tiştên
ku li beyarê bûn xist û li hemûya
gîhayên beyarê xist û hemû
darên ku li beyarê ne şikestandin.
26 Tenê li welatê Goşenê, ya ku
lawên Îsraêl lê ne, zîpik nebû[2].
27 Û Fîrawûn şand û bangî Mûsa
û Harûn kirin û ji wan re got: Vê
carê sûc kirim; XUDAN bi dad e
û ez û netewa min, em xerab in.
28 Lava ji XUDAN re bikin; ev
gurmîniya ezmanan ya xurt û ev
zîpik bes e û ez ê we berdim û êdî
hûn ê nesekinin. 29 Û Mûsa jê re
got: Gava ez ji bajêr ve derkevim,
ez ê destên xwe dirêjî XUDAN
bikim; ji bo ku tu bizanibe dinya
ya XUDAN e, dê ev gurmîniyên
ezman bisekinin û dê êdî zîpik ne-
barin. 30 Lê belê gava em werin
te û qûlên te, ez dizanim ku hûn
ê ji XUDAN Xwedê ve netirsin.
31 Û li kitan û ceh hatin lêxistin,
ji ber ku ceh simil dabû û kitan jî
bi çîçeg bûbû. 32 Lê belê, li ge-
nim û çewder nehatin lêxistin; ji
ber ku ew nebûbûn. 33 Û Mûsa ji
cem Fîrawûn, ji bajêr ve derket.
Û destên xwe dirêjî XUDAN kir
û gurmîniyên ezman û zîpik se-
kinîn û baran bi erdê ve nerijiya.
34 Û gava Fîrawûn dît ku baran û
gurmîniyên ezmanan sekinî, dîsa
sûc kir û ew û qûlên wî, dilên xwe
hişk kirin. 35 Û dilê Fîrawûn hişk
bû û mîna ku XUDAN bi navdîti-

1 Miletek.

2 Nebariya.

ya Mûsa gotibû, lawên Îsraêl
berneda.

*Asîwa Kulliyan*

Zeb 78,46; 105,34-35; Yow 1,2-12

10 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Here cem Fîrawûn; ji ber
ku min dilê wî û dilên qûlên wî
hişk kir; da ku, ez van elametên
xwe di nav wan de xuya bikim;
2 tu jî ji lawê xwe re û ji kurê lawê
xwe re, tiştên ku li Misirê kirime
û elametên ku di nav wan de kiri-
me, bi methelokan[1] bibêje û hûn
bizanibin ku ez XUDAN im. 3 Û
Mûsa û Harûn çûn cem Fîrawûn
û jê re gotin: Xwedayê Îbraniyan
XUDAN, wusa dibêje: Ma tuyê
heta kengê nexwazî ku li ber min
biçûk bibe? Netewa min berde, da
ku, bila peristinê ji min re bikin!
4 Ya na, ger tu nexwaze ku netewa
min berde, a vay, ez ê sibê kulliyan
bînim[2] sînorên te 5 û dê rûyê erdê
binuxumînin û dê dîtina erdê qet
nebe. Û dê tiştên ku ji ber zîpikê,
ji we re mane bixwin û hemûya
darên ku li çolê ji bo we derketi-
ne dê bixwin 6 û malên te û malên
hemû qûlên te û hemûya malên
Misiriyan ve tijî bibin; bavên te û
kalikên bavên te, ji cergî ku li rûyê
erdê ne, heta îrojê tiştekî wusa ne-
dîtine. Û zivirî û ji cem Fîrawûn
ve derket. 7 Û qûlên Fîrawûn jê re
gotin: Dê heta çi wextî ev zilama
ji te re bibe dafik? Zilaman berde
ku bila ji Xwedayê xwe XUDAN
re peristinê bikin! Ma qey hîn tu
nizanî ku Misir xopan[3] bûyiye?
8 Û Mûsa û Harûn dîsa vegeran-
din, anîn cem Fîrawûn û ji wan re
got: Herin, ji Xwedayê xwe XU-
DAN re peristinê bikin! Lê belê yê
ku herin kî ne? 9 Û Mûsa got: Em
ê bi xortên xwe û kalên xwe re he-
rin[4]; bi lawên xwe û qîzên xwe, bi
mîh û gayên xwe em ê herin; ji ber
ku em ê cejna XUDAN çêbikin.
10 Û ji wan re got: Ger ez we û
zarokên we berdim, wê çaxê bila
XUDAN bibe alîkarê we! Binêrin;
ji ber ku nêta we xerab e! 11 Ûsa
nabe! Niha hûn, yên mêr herin pe-
ristinê ji XUDAN re bikin; ji ber
ku xwestina we ev e. Û ew ji cem
Fîrawûn ve hatin qewirandin.
12 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Bona kulliyan, destê xwe bi ser
welatê Misirê ve dirêj bike, da ku,
bila derkevin ser Misirê û hemû
gîhayên welat, her tiştên ku zîpik
hiştine, bila bixwin. 13 Û Mûsa
çoyê xwe bi ser welatê Misirê
ve dirêj kir û di tûmiya wê roj û
şevê de XUDAN, bayê rojhilatê
da welêt û dema bû sibeh, bayê
rojhilatê kulliyan anîn. 14 Û kullî

---

1 Mîna çîrokekê bibêje.
2 Bişînim sînorên te.
3 Perîşan.
4 An jî: Bi yên xwe ên ku kalepîr bûne re herin.

derketin ser hemûya welatê Mi-
sirê û daketin ser hemûya sînorên
Misirê, zehf bûn; berî vêya ewqas
kullî mîna ev carî ne bûbû, dê
paşî vêya jî mîna vê nebe. 15 Û
hemûya rûyê erdê nuxumandin û
welat tarî bû û hemûya gîhayên
erdê û hemû mêwê daran yên ku
ji ber zîpikê mane, xwarin û di
hemûya welatê Misirê de, di darê
beyarê de û di gîhayê wê de qet tu
hêşînahî nema.
16 Û Fîrawûn bi lezî bangî Mûsa
û Harûn kir û got: Min li dijî
Xwedayê we, XUDAN û li dijî
we guneh[1] kir! 17 Niha ez rica
dikim, lê tenê vî carî li sûcê min
biborîne, tenê bona ku vê mirinê
ji ser min rake, li ber Xwedayê
xwe XUDAN ve bigerin! 18 Û
ew ji cem Fîrawûn derket û li ber
XUDAN geriya. 19 Û XUDAN
bayekî zehf xwurt ya rojava zivi-
rand û wan kulliyan rakir û ber bi
Behra Gewez[2] ve ajot; di hemûya
sînorên Misirê de tenê kulliyek
nema. 20 Lê belê XUDAN dilê
Fîrawûn hişk kir û wî lawên Îsraêl
bernedan.

*Asîwa Tariyê*

Zeb 105,28; Pey 16,10-11

21 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Destê xwe ber bi ezmên ve dirêj
bike, bila li ser welatê Misirê ta-
riyek wusa bibe ku mirov bika-
ribe pê bihese[3]. 22 Û Mûsa des-
tê xwe berbi ezmên ve dirêj kir
û di hemûya welatê Misirê de,
reşetariyek çêbû[4]; 23 hev û din
nedîtin û tu kes sê roj ji cîhê xwe
ranebû, lê belê di malên wan de,
bona hemûyên lawên Îsraêl ro-
nahî hebû. 24 Û Fîrawûn bangî
Mûsa kir û got: Herin, ji XU-
DAN re peristinê bikin! lê belê
tenê bila mîh û gayên we bimînin;
bila maliyên we jî tevî we herin!
25 Û Mûsa got: Divê tu qurban
û pêşkêşiyên şewitandinê jî bidî
me, da ku, em ji Xwedayê xwe
XUDAN re qurbanan serjê bikin.
26 Û dê heywanên me jî tevî me
herin; dê tenê neynûkek jî neyê
berdan; ji ber, bona ku em peris-
tinê ji Xwedayê xwe XUDAN re
bikin, ji wan ve bigirin û berî ku
em bigihêjin wê derê, divê em bi-
zanibin ka em ê çi peristinê ji XU-
DANê xwe re bikin! 27 Lê belê
XUDAN dilê Fîrawûn hişk kir û
wî nexwest ku wan berde. 28 Û
Fîrawûn jê re got: Ji serê min ve
here, xwe biparêze, carekî din
wecê min nebîne; ji ber, tuyê di
roja ku tu wecê min bibînî de bête
kuştin! 29 Û Mûsa got: Te qenc
got; êdî ez ê wecê te nebînim!

1 Sûc.
2 Behra sor.
3 An jî: Mirov bikaribe bi dest ve pelandinê (girtinê, pê bigirin).
4 Destpê kir.

11 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Ez ê asîwekî din bînim serê
Fîrawûn û serê Misirê, li pêy wê,
dê we ji vir berde. Dema ku we
berde, muheqeq dê we bi tûmî ji vê
derê biqewirîne. 2 Niha ji guhên
netewê re bibêje û bila her zilam
ji cîranê xwe û her pîrek ji cîranê
xwe tiştên zêr û tiştên zîv bixwa-
zin. 3 Û XUDAN di çavên Misiri-
yan de xêrê da netewê. Mûsa jî di
welatê Misirê de, di çavên qûlên
Fîrawûn de û di çavên netewê de
zilamekî zehf mezin bû.
4 Û Mûsa got: XUDAN wusa
dibêje: Ez ê di wextên nîvê şevê de
derkevim nava Misirê 5 û ji pêşiyê
Fîrawûnê ku li ser textê rûniştiye,
heta pêşiyê cariya ku li paş êş e,
dê li welatê Misirê, hemûyên ku
pêşiyê welidîne û hemû pêşiyên
heywanan dê bimirin. 6 Û dê li
hemûya welatê Misirê, qêrîneke
mezin bibe ku, mîna wê nebûye
û ne jî dê bibe. 7 Û bona ku hûn
bizanibin ka XUDAN çawa Mi-
siriyan ji Îsraêliyan ve cuda dike,
ji mirov, heta heywanan, li dijî
hemûyên lawên Îsraêl, dê kûçi-
kek jî devê xwe veneke[1]. 8 Û dê
hemûyên van qûlên te, ji min re
dakevin û dê xwar bibin û ji min
re bibêjin: Tu û hemûyê netewa
ku li pêy te diçin, derkevin! Û li
pêy wê ez ê derkevim, bibêjin. Û
ji cem Fîrawûn ve bi hêrsekî dij-
war derket.
9 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Bona ku li welatê Misirê nuwa-
zeyên min zêde bibin, dê Fîrawûn
we guhdarî neke. 10 Û Mûsa û
Harûn, hemûyên van nuwaze-
yan li ber Fîrawûn çêkirin; lê belê
XUDAN dilê Fîrawûn hişk kir û
wî lawên Îsraêl ji welatê xwe ve
bernedan.

*Cejna Fisihê*

2.Mûs 13,3-10; 3.Mûs 23,4-8;
4.Mûs 28,16-25; 5.Mûs 16,1-8;
Lûq 22,7-20; 1.Kor 5,7-8

12 Û XUDAN di welatê Mi-
sirê de, bi Mûsa û Harûn
re axifî û got: 2 Ev meha dê bona
we bibe destpêka mehan, dê ji we
re bibe meha pêşîn ya salê. 3 Bi
hemûya civaka Îsraêlê re biaxifin
û bibêjin: Dê di dehê vê mehê de,
her yek bona xwe berxikekî, li gor
malên bapîrên xwe ji malekê re,
dê berxikekê bistîne 4 û ger bona
berxikekê xanî biçûk be, bila ew
li gor xwe û hejmara canên cîranê
xwe yî herî nêzîk berxikekê bistî-
ne; hûnê bona berxê, li gora xwa-
rina her yekî bihesibînin. 5 Bila
berxika we bêqisûr, nêr û yeksalî
be; hûn ê ji xwe re, ji mîh an jî
ji bizinan bistînin. 6 Û hûn ê wî
heta çardehê vê mehê veşêrin û
hemûya gelê civaka Îsraêlê, dê wî
berbi êvarê serjê bikin. 7 Û dê ji

1 An jî: Kûçikek jî neewte.

xwînê ve rahêjin û li her du beştê
piştgirê derî û şêmûga jorîn ya
deriyê xaniyê ku dê tê de bixwin,
bidin. 8 Û dê wê şevê goştê ku
di agir de hatiye qelandin û nanê
bêhavên bixwin; dê wî bi gîhayên
tahl ve bixwin. 9 Hûn ê ji wî qet
bi xavîtî an jî mîna ku di avê de
hatiye xaşandin[1] nexwin, lê belê
tevî serî û pê û hûr û rêviyên wî,
wekî di agir de qeliya be, bixwin.
10 Û heta sibehê hûn ê tu tiştî ji
wî ve nehêlin; lê belê hûn ê yên ku
heta sibehê ji ber mayîne, di nav
agir de bişewitînin. 11 Û hûn ê wî,
bi vî awayî bixwin: Dê piştikên
we girêdayî, çaroxên we di lingên
we de û çoyên we di destên we de
bin û hûn ê bi lezî wî bixwin; ew
Fisiha XUDAN e. 12 Û ez ê wê
şevê ji Misirê ve derbas bibim û ji
mirov, heta heywanan, li hemûyên
ku pêşiyê zayîne bixim û darazi-
yan ji îlahên Misirê re bikim; ez
XUDAN im. 13 Û xwîna li ser xa-
niyên ku, hûn tê de ne, dê ji we re
bibe nîşan û gava ez xwînê bibî-
nim, ez ê ji ser we ve derbas bibim
û dema li welatê Misirê bixim, ji
bo helaq kirinê di nav we de asîv
nabe. 14 Û îroj dê ji bo we bibe
roja bîranînê, hûn ê wê ji XUDAN
re bikin cejin; bi nifşeyên xwe,
hûn ê wê bikin cejin û zagonek
abadîn.

*Cejna Nanê Bêhavên*

15 Hûn ê heft rojî nanê bêhavên
bixwin; heta roja yekemîn, hûn ê
ji malên xwe, havênê rakin; ji ber,
her canê ku ji roja yekemîn heta
roja heftemîn nanê bihavên bixwe,
dê ji Îsraêlê ve bête avêtin. 16 Û
dê di roja yekemîn de civakek
pîroz çê bibe, di roja heftemîn de
jî dê civakek pîroz çê bibe[2], di
wan rojan de divê di nava we de
tu karek neyê kirin, tenê bona her
canî tiştên xwarinê, divê ji aliyê
we ve tenê ev bête kirin. 17 Û hûn
ê cejna nanê bêhavên pîroz bikin,
ji ber ku min artêşên we eynî di wê
rojê de ji welatê Misirê ve derxistin
û hûn ê vê rojê, di nifşeyên xwe
de bi zagonekî abadîn bigirin. 18
Di meha yekemîn de, ji êvara roja
çardehê mehê heta êvara roja bîst
û yekê mehê, hûn ê nanê bêhavên
bixwin. 19 Divê heft roj, li malên
we havên tunebin; ji ber ku her
canê ji yê bihavên bixwe, dixwaze
biyan be an jî li welêt hatibe dinê,
dê ji civaka Îsraêlê ve bête avêtin.
20 Hûn ê qet nanê bihavên nexwin,
di hemû malên xwe de nanên
bêhavên bixwin.

*Cejna Fisihê ya yekemîn*

21 Û Mûsa bangî hemû kalepîrên
Îsraêlê kir û ji wan re got: Li gor
malbatên xwe, ji xwe re berxikan

---

1 Xaşandin, an jî: Kelandin.

2 An jî: Bicive.

bikşînin û bistînin û Fisihê ser-
jê bikin. 22 Û divê hûn pariyek
gîhayê zûfa rahêjin, di xwîna ku
di leganê de yî de dakin û ji xwîna
ku di leganê de yî li her du beştên
piştgirên derî û şêmûga jorîn ya
derî bireşînin, heta sibê divê kesek
ji we, qet ji deriyê xwe ve der-
nekeve. 23 Û XUDAN, bona ku
li Misiriyan bixe dê derbas bibe
û gava xwîna li ser her du beştên
piştgirên derî û şêmûga jorîn bibî-
ne, dê XUDAN ji ser derî ve der-
bas bibe û dê nehêle ku helaqkir,
bona lêxistina we têkeve malên
we. 24 Û hûn ê vî tiştî, bona xwe
û zarokên xwe, bi zagonî abadîn
bigirin. 25 Û dê ûsa bibe, mîna
ku XUDAN gotibû dema hûn bi-
gihêjin welatê ku dê bide we, hûn
ê vê xizmetê bikin. 26 Û dema
zarokên we ji we re, pirsa: Mahna
vê xizmetê çî ye? bipirsin, 27 hûn
ê: Vêya qurbana cejna Fisiha XU-
DAN e, ya ku dema li Misiriyan
xist, li Misirê ji ser xaniyên lawên
Îsraêl ve derbas bû û xaniyên me
xelas kirin bibêjin. Û netewe xwar
bû û secde kir. 28 Û lawên Îsraêl
çûn û wusa kirin; mîna ku XU-
DAN emir dabû Mûsa û Harûn,
wusa kirin.

*Mirina Pêşîzayînan*

2.Mûs 11,1-8; Zeb 105,36; 136,10

29 Û di nîvê şevê de, wusa bû
ku XUDAN ji pêşiyê Fîrawûnê
ku li ser texta xwe rûniştiye, heta
yê pêşiyê hêsîrê ku di zîndanê
de ye, li welatê Misirê, hemûyên
ku pêşiyê welidîne û hemû pêşi
zayînê heywanan ve xist. 30 Û
şevê Fîrawûn, ew bi xwe û hemû
qûlê wî û hemûyên Misiriyan
rabûn û li Misirê qêrînek mezin
hebû; ji ber xaniyek ku di hundirê
wê de mirî nîn be, tune bû.

*Ji Misirê derketin*

31 Û şevê wî bangî Mûsa û Harûn
kir û ji wan re got: Rabin, him
hûn û him jî lawên Îsraêl, ji nava
netewa min derkevin û herin,
mîna ku we digotin, ji XUDAN
re peristinê bikin; 32 mîna ku we
digotin, mîhên xwe, gayên xwe
jî rahêjin û herin û min jî pîroz
bikin! 33 Û Misiriyan, bona ku
wan bi lezî ji welêt ve derxînin,
zorê dan netewê; ji ber ku digotin:
Em gişt mirin! 34 Û netewe he-
vîrên xwe yên ku hîn havênê ne-
girtibûn, teştên hevîran, bi kincên
wan ve pêçayî û li ser milên xwe
ve birin. 35 Û lawên Îsraêl, li gor
gotina Mûsa kirin û ji Misiriyan,
tiştên zêr û tiştên zîv û kincan
xwestin. 36 Û XUDAN, di ça-
vên Misiriyan de xêrê da netewê
û xwestinên wan dan wan û wan
Misiriyan şelandin.
37 Û lawên Îsraêl, xeynî zarok û
pîrekan, qasî şeş sed hezar mêr, bi
peyatî ji Ramsesê koçbariyî Suk-

kotê kirin. 38 Û mîh û ga û tevî gellekî heywanan, komek mezin ya gel jî tevî wan derketin. 39 Û ji hevîrê ku ji Misirê ve derxistibûn, lewaşên bêhavên çêkirin; ji ber ku ew hevîr havên negirtibû, ji ber ku ji Misirê ve hatibûn qewirandin[1] û hêz neanîbûn ku bisekinin û bona xwe jî zewêde amade bikin. 40 Û hemûya wextên ku lawên Îsraêl li Misirê mayîne[2] çar sed û sîh sal bûn. 41 Û wusa bû ku, paşî çar sed û sîh salî hemûya artêşên XUDAN, eynî wê rojê ji Misirê ve derketin. 42 Ew şeva bona ku wan ji welatê Misirê ve derxistine, şevek ku bona XUDAN bi girîngî bête girtinê ye; ew e, şeva XUDAN, ya ku dê ji aliyê hemû lawên Îsraêl ve û ji aliyê nifşeyên wê ve bi girîngî bête girtin.

*Qaîdeyên Fisihê*

4.Mûs 9,1-14

43 Û XUDAN, ji Mûsa û Harûn re got: Zagona Fisihê ev e; divê qet yekî biyan ji wê nexwe. 44 Lê belê dîlê her zilamî, yê ku wî bi peran stendine, paşî ku bête sunet kirin, dibe ku ji wê ve bixwe. 45 Lê divê xulamê biyan û yê bi pere ve dixebite, ji wê nexwe. 46 Li malekê dê bête xwarin: Hûn ê ji goştê wê ve dernexînin der ve û divê hûn ji wê ve hestiyê neşikînin. 47 Dê hemûya civaka Îsraêlê bi wê bigirin. 48 Û xerîbê ku tevî te mêvan e, ger bixwaze ku Fisihê ji XUDAN re bike, bila hemûyên mêrên wan, bêne sunet kirin û bila wê demê, bona ku wê bike, nêzîk bibe û dê bibe mîna zilamê ku li welat ve bûyiye; lê belê divê tu kesê bêsunet ji wê ve nexwe! 49 Bona zilamê ku li welêt ve bûyiye û bona xerîbê ku di nava we de mêvan e, divê zagon[3] yek be. 50 Û hemûyên lawên Îsraêl wusa kirin: Mîna ku XUDAN emir dabû Mûsa û Harûn, li gor wê kirin. 51 Û wusa bû ku, XUDAN di eynî wê rojê de lawên Îsraêl, ji aliyê artêşên xwe ve ji Misirê ve derxistin.

*Nezirkirina yên Pêşîzayîne*

4.Mûs 3,11-13; 3,40-51; 18,15-17

13 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 2 Hemûyên ku pêşiyê bûyîne, di nav lawên Îsraêl de, di mirov û heywan de, yên ku pêşiyê rehmê vekirine, bona min pîroz bikin, ew yên min in.

3 Û Mûsa ji netewê re got: Ew roja ku hûn ji Misirê, ji mala hêsîriyê ve derketine, di bîra xwe de bînin; ji ber ku XUDAN, bi hêza dest ve we ji wir derxistin; dê nanê bihavên neyê xwarin. 4 Hûn ê îroj,

---

1 Hatibûn ajotin.
2 An jî: Rojên ku lawên Îsraêl li Misirê rûniştine
3 Zagon, an jî: Şerîet..

di meha Abîbê de derkevin. 5 Û
dê wusa bibe ku, dema XUDAN
te bîne welatê Kenanî û Hîttî û
Amorî û Hîvî û Yebûsiyan, welatê
ji wê şîr û hungiv diherikin û ji
kalên te re peymanê danîbû ku, dê
bide te, tuyê di vê mehê de wê xiz-
metê bikî. 6 Tuyê heft rojan nanê
bêhavên bixwe û roja heftemîn, dê
ji XUDAN re bibe cejin. 7 Dê heft
roj nanê bêhavên were xwarin û
divê di te de nanê bihavên neyê
dîtin û di nava hemûyên sînorên te
de havên neyê dîtin. 8 Û di wê rojê
de tuyê ji lawê xwe re bigehîne û
bibêje: Ev bona karên ku dema
ez ji Misirê derketim, XUDAN
ji min re kiriye yî. 9 Û dê li ser
destê te nîşan û di nava çavan de,
bona te bîranîn hebe, da ku, bila
zagona XUDAN di devê te de be,
ji ber ku XUDAN bi destê xwurt,
te ji Misirê ve derxist. 10 Û ji salê,
heta salê, di demên bijartî de, tuyê
bi vê zagonê bigire. 11 Û dê wusa
bibe ku, mîna XUDAN ji te û
bapîrên te re sond xwaribû, dema
te anî welatê Kenaniyan û wê da
te, 12 hemûyên rehmê vekirine û
pêşî zayînên heywanên ku aidî te
ne, tuyê ji XUDAN re hilbijêre; dê
zilam bibin yên XUDAN. 13 Lê
belê bona pêşî zayiyê kerê, tuyê
berxikekê bi berdêlî[1] bide û ger
tu berdêlê nedê, divê tu histuyê
wê bişikîne û di nava lawên te de,
bona hemûyên pêşîbûyînê miro-
van, tuyê berdêlê bidê. 14 Û dê
wusa bibe ku, di pêşiyê de dema
ku lawê te ji te re: Ev çî ye? bi-
bêje, tuyê jê re bibêje: XUDAN
me ji Misirê, ji mala hêsîriyê, bi
hêza dest ve derxistin 15 û wusa
bû ku, dema Fîrawûn ji bo ku me
bernede, inyadê kir, XUDAN li
welatê Misirê ji pêşiyên mirov,
heta pêşiyê heywan, hemûyên ku
pêşiyê bûyîne kuşt; bo vê yekê,
ez; hemû zilamên ku rehmê veki-
rine, ji XUDAN re dikim qurban;
lê belê ez bona hemû pêşîbûyînên
lawên xwe berdêlê didim. 16 Û dê
li ser destê te nîşan û di nava ça-
vên te de girêdanka eniyê hebe; ji
ber ku me ji Misirê, bi hêza dest
ve derxistin.

*Derbasbûna Behra Gewez*

4.Mûs 33,1-5; Neh 9,12

17 Û wusa bû ku, dema Fîrawûn
netewê berda, Xwedê wan ji rêya
welatê Filistiyan ve, li hember
nêzîk bûna wê, dîsa jî nebirin; ji
ber ku Xwedê got: Dema nete-
we şer bibîne, dê poşman bibe û
vegere Misirê; 18 lê belê Xwedê
netewê ji rêya çola Behra Gewez
ve gerand û lawên Îsraêl, ji Mi-
sirê bi çekgirêdanê ve derketin.
19 Û Mûsa hestiyên Ûsiv, tevî
xwe rahişt; ji ber ku ji lawên Îsraêl
re, bi gotina: Bi rastî dê Xwedê

1 Bi fidyeyî.

serîdanka we bike û hûn ê hesti-
yên min, tevî xwe ji vê dera der-
xînin! sondê dabû xwarin. 20 Û ji
Sûkkotê ve koç kirin û li Etamê di
qeraxa çolê de danîn. 21 Û XU-
DAN bona ku bi şev û roj bimeşin
û ew rê nîşanî wan bide, bi rojê di
sitûna ewrê de, bi şevê jî bona ku
ronahiyê bide wan, di sitûna agir
de, di pêşiya wan de diçû. 22 Rojê
sitûna ewrê û şevê jî sitûna agir ji
pêşiya netewê ve neqetiyan.

14 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 2 Ji lawên Îsraêl re
bibêje, bila vegerin û li ber Pî-
Hahîrotê, di nava Mîgdol û behrê
de, li ber Baal-Sefon, konê xwe
deynin; hûn ê li hember wê, li cem
behrê konê xwe deynin. 3 Û dê
Fîrawûn, di derheqê lawên Îsraêl
de bibêje: Ew di nava welêt de
hatine girtin. Çol hawirdor li wan
girtiye. 4 Û ez ê dilê Fîrawûn hişk
bikim û dê bi pêy wan bikeve û ez
ê di Fîrawûn û hemûya artêşa wî
de meziniyê bibînim û dê Misirî
bizanibin ku XUDAN ez im. Û
wusa kirin. 5 Û reva netewê ji
qiralê Misirê re hate têgihandin û di
derheqê netewê de dilên Fîrawûn
û qûlên wî hatin guhertin û gotin:
Ma gelo me çi kir, me Îsraêliyan
berdan, bona ku ew êdî ji me re
qûlitiyê mekin[1]? 6 Û ereba xwe ya
cengê amade kir û netewa xwe tevî
xwe rahişt 7 û şeş sed heb erebeyên
cengê yên bijartî, li ser her yekê
şervanê erebê hebûn, hemûyên
erebeyên cengê, yên Misirê tevî
xwe girtin. 8 Û XUDAN, dilê
qiralê Misirê Fîrawûn hişk kir û ew
bi pêy lawên Îsraêl ve ketin û lawên
Îsraêl, bi destê bilind ve derketin.
9 Û Misiriyan, hemûya erebeyên
cengê û hespên Fîrawûn û siwarên
wî û artêşa wî, bi pêy wan ketin û
hîn ew li qeraxa behrê li cem Pî-
Hahîrotê, li ber Baal-Sefon konên
xwe danîbûn, gîhaştin wan.
10 Û Fîrawûn nêzîk bû û lawên
Îsraêl çavên xwe bilind kirin û a
vay, Misirî li pêy wan dimeşiyan
û zehf tirsiyan û lawên Îsraêl,
qêrînê ji XUDAN re kirin. 11 Û
ji Mûsa re gotin: Ma qey li Misirê
gor tune bûn ku, te me bona mi-
rinê anî çolê? Ma bi ji derxistina
Misirê, ev karê ku te ji me re kir çî
ye? 12 Ma gotina ku me li Misirê
ji te re gotin: Dev ji me berde ku,
em qûlitiyê ji Misiriyan re bikin
ne ev e? Ji ber, heta ku em li çolê
bimirin, ji Misiriyan re qûlitiyê
bikirana, bo me dê çêtir bibûya.
13 Û Mûsa ji netewê re got: Me-
tirsin, bi aramî bisekinin û îroj
xelasiya ku dê XUDAN ji bo we
çêbike, bibînin; ji ber, hûn ê Misi-
riyên ku îro we dîtine, êdî abadîn

1 An jî: Ma me çi kir ku me Îsraêliyan ji qûlitiya bona ku ji me re bikin berda?

nebînin. 14 Dê XUDAN bona we cengê bike û hûn ê bêdeng bimînin.
15 Û XUDAN ji Mûsa re got: Çima tu ji min re feryadê dikî[1]? Ji lawên Îsraêl re bibêje, bila pêş ve biçin. 16 Û tu jî çoyê xwe bilind bike û destê xwe bi ser behrê ve dirêj bike û wê biqelişîne û dê lawên Îsraêl ji cîhê ziwa ve bikevin nava behrê. 17 Û ez, a vay, ez ê dilê Misiriyan hişk bikim û dê bi pêy wan bikevin û ez ê di Fîrawûn de û di hemûya artêşa wî de, di erebeyên wî, yên cengê û siwarên wî de meziniyê bibînim. 18 Û dema ez di Fîrawûn de, di erebeyên wî, yên cengê de û di hespiyan de meziniyê bibînim, dê Misirî bizanibin ku ez, XUDAN im. 19 Û milyaketê Xwedê, yê ku li pêşiya artêşa Îsraêlê ve dimeşiya, cîhê xwe guhert û li paş wan meşiya û sitûna ewrê ji pêşiya wan, cîhê xwe guhert û li paşiya wan sekinî 20 û hat nava artêşa Misirayan û artêşa Îsraêliyan û ewr û tarîbûn hebûn, lê belê şevê ronahî dikir û di hemûya şevê de, yek nêzîkî yê din nebûn.
21 Û Mûsa destê xwe bi ser behrê ve dirêj kir û XUDAN di hemûya şevê de, bi bayê rojhilatê, ya xwurt re, behrê şunda vegerand û behrê kir girav û av qelişîn. 22 Û lawên Îsraêl, ji cîhê ziwa ve ketin nava behrê û av di çep û rastên wan de, ji wan re bûn dîwar 23 û Misirî li pêy wan, berra wan dan û hemûyên hespên Fîrawûn û erebeyên wî ên cengê û siwarên wî, li pêy wan ketin nava behrê 24 û di nobeya sibehê de wusa bû ku, XUDAN ji sitûna agir û ewrê, li artêşa Misiriyan nihêrt û artêşa Misiriyan xera kir. 25 Û tekerên erebeyên wan derxistin û bi zorê wan ajotin û Misiriyan gotin: Em ji ber Îsraêliyan birevin; ji ber ku XUDAN, bona wan bi Misiriyan re şer dike!
26 Û XUDAN ji Mûsa re got: Destê xwe ber bi behrê ve dirêj bike, da ku, bila av vegerin ser Misiriyan, ser erebeyên wanî cengê û siwarên wan. 27 Û Mûsa destê xwe, bi ser behrê ve dirêj kir û ber bi sibehê behr vegeriya herikandina xwe û ji ber wê, Misiriyan reviyan û XUDAN Misiriyan ji nava behrê ve dawişandin û avêtin. 28 Û av vegeriyan û ser erebeyên wî yên cengê û siwarên wî û hemû artêşa Fîrawûn, ya ku li pêy wan ketine behrê, nuxumandin; ji wan tenê leşkerek jî nema. 29 Lê belê lawên Îsraêl di nava behrê de, ji cîhê ziwa ve meşiyan û av bona wan li rast û çepên wan de bûn dîwar. 30 Û XUDAN di wê rojê de, Îsraêliyan ji destê Misiriyan ve xelas kir û Îsraêlî, Misiriyan li ber behrê, bi mirîtî dîtin. 31 Û

1 Çima tu ji min re qêrîn, an jî: Gazincan dikî?

Îsraêl, karê XUDAN ya mezin
ku li ser Misiriyan kiribû, dîtin û
netewe ji XUDAN ve tirsiyan û
baweriya xwe bi XUDAN û qûlê
wî Mûsa ve anîn.

*Qesîda Xelasiyê*

Pey 15,2-4; Serw 5; 2.Sam 22

15 Wê gavê, Mûsa û lawên Îs-
raêl, vê qesîda ji XUDAN
re gotin[1] û axifîn: Ez ê ji XUDAN
re bistirêm, ji ber ku gellekî bilind
bû; hesp û siwarê wê avêt behrê.
2 XUDAN hêz û murxa[2] min e;
ew ji min re bû xelasî; ew Xwe-
dayê min e û ez ê şikiryê jê re
bikim; Xwedayê bavê min e û
ez ê wî bilind bikim. 3 XUDAN
mêrxasê cengê ye; navê wî XU-
DAN e. 4 Erebeyên cengê, yên
Fîrawûn û artêşa wî avêtin behrê
û şervanên bijartî, yên erebeyan
li Behra Gewez ve noqî avê bûn.
5 Balûpal wan dinixumînin; mîna
keviran daketin kûritiyan. 6 Destê
te yê rastê ya XUDAN, bi qudretê
ve hatiye xemilandin; destê te yê
rastê ya XUDAN, neyaran eci-
qand! 7 Û tuyê, yên ku li dijî te
serî hildane, di zêdeyiya mezina-
hiya xwe de bieciqînî. Tu xezeba
xwe dişînî, wan mîna firêze di-
xwe. 8 Û bi hilma hêrsa pozê te
av kom bûn, herikandin, mîna ko-
mekî sekinîn; kûritî di nava behrê
de qeşa girtin. 9 Neyar got: Ez ê li
pey bidim û bigihêjim wan; talanê
par ve bikim; dê ji wan, canê min
têr bibe; ez ê şûrê xwe bikişînim,
dê destê min wan helaq bike!
10 Te bi bayê xwe, wan pif kirin,
behrê wan nuximandin; di avên
mezin de mîna gullê noq bûn.
11 Di nava îlahan de mîna te kî
heye, ya XUDAN? Di pîroziyê
de nuwaze, di pesnahiyan de bi
sawêr, ma kî heye mîna te nu-
wazeyan dikî? 12 Te destê xwe
yî rastê dirêj kir, erd wan daqur-
tandin.
13 Tu bi xêra xwe, ji netewa ku
te xelas kiribû re, bû rêber; bona
cîhê xwe yî pîroz, bi qudreta xwe
te rê nîşanî wan kirin. 14 Netewe
bihîstin û lerizîn; jan bi yên ku li
Filistînê rûdinin ve ketin. 15 Wê
gavê mîrên Edomê tirsiyan: Leri-
zandin bi egîdên Moabê ve ketin;
hemûyên ku li Kenanê rûdiniştin
huliyan. 16 Tirs û toqîn kete ser
wan; heta ku netewa te derbas
bibe, ya XUDAN, heta ku ev gelê
ku te ji xwe re kiriye netewe der-
bas bibe, bi mezinahiya bazûya
te mîna keviran bê tevger bûn.
17 Tuyê wan bîne hundir û di çi-
yayê mêrasa xwe de, ya XUDAN,
li cîhê ku te bona rûniştina xwe
çêkiribû, ya Xudan, tuyê li cîhê
pîroz, ya ku destên te ava kiribû,

---

1 Stirîn.

2 Mezmûr, an jî: Zebûra min e.

wan bicîh bikî. 18 Dê XUDAN abadîn û her tim serweriyê bajo!

19 Ji ber ku hespên Fîrawûn, tevî erebeyên wî yên cengê ketin behrê û XUDAN avên behrê bi ser wan ve vegerandin; lê belê lawên Îsraêl, di nava behrê de, ji cîhê ziwa ve meşiyan. 20 Û xwuşka Harûn, Nebiye[1] Mîryam, tefê rahişt destê xwe û hemû pîrek jî bi tef û reqisandinê li pêy wê derketin.

21 Û Mîryam bersivê da wan: Murxan ji XUDAN re bibêjin, ji ber ku zehf bilind bû; hesp û siwarê wê avêt behrê!

*Îsraêl li Mara û Elîmê*

4.Mûs 33,8-9

22 Û Mûsa, Îsraêl ji Behra Gewez ve wêdetir bir û derketin çola Şûrê û di çolê de sê roj meşiyan û avê nedîtin. 23 Û hatin Marayê, hêz neanîn ku avên Marayê vexwin, ji ber ku tahl bûn; bo vê yekê, navê Mara[2] lê kirin. 24 Û netewe li dijî Mûsa, bi gotina: Em ê çi vexwin? serî hildan. 25 Û wî gazincan ji XUDAN re kir û XUDAN darekî nîşanî wî kir û wê avêt nava avan û av şêrîn bûn. Li wir bona wan darazî û zagonê danî û li wir, wan ceribandin 26 û got: Ger tu qenc guh bidî gotinên Xwedayê xwe XUDAN û tiştên ku di çavên wî de rast in, bikî û guh bidî emirên wî û bi hemûya zagonên wî bikî, ez ê nexweşiyên ku dame Misiriyan, yekî jî nedim te; ji ber ku ez, XUDANê ku şîfayê dide te me!

27 Û hatin Elîmê, li wir donzdeh çavkaniyên avê û heftê darên xurmê hebûn û li wir, li cem avan qonaxa xwe danîn[3].

*Gel Gazincan dike*

4.Mûs 11,4-6; Neh 9,15-20; Zeb 78,23-31

16 Û ji Elîmê koç kirin û hemûya civaka lawên Îsraêl, paşî ku ji Misirê derketîbûn, di roja panzdeha meha duwemîn de, hatin çola Sînayê, ya ku di navbera Elîm û Sînayê de ye. 2 Û hemûya civaka lawên Îsraêl li çolê, li dijî Mûsa û li dijî Harûn gazincan kirin 3 û lawên Îsraêl ji wan re gotin: Xwezîka dema em li Misirê, li ber qazanên goşt rûdiniştin, têra xwe nan dixwarin bi destê XUDAN ve miribûna. Ji ber, we bona ku hemûya civakê ji birçînan bukujin me derxistin vê çolê!

4 Û XUDAN ji Mûsa re got: A vay, ez ê bona we ji ezman ve nan bibarînim û ka dê di zagona min de bimeşin an jî nameşin, bona ku ez wan biceribînim, dê netewe her roj derkeve û nanê rojane berhev bike.

5 Û dê wusa bibe ku di roja şeşan

---

1 Peyxamber.

2 Tehlî, tal.

3 Koç, an jî: Konê xwe danîn.

de hemûyên anîne, dê amade bikin
û dê bibe du qatê berhevkirinên
wanî her rojî. 6 Û Mûsa û Harûn ji
hemûyên lawê Îsraêl re gotin: Hûn
ê êvarê bizanibin ku XUDAN we ji
welatê Misirê ve derxistine 7 û hûn
ê sibehê jî bilindahiya XUDAN bi-
bînin; ji ber ku XUDAN gazincên
we, yên ku li dijî wî ne dibihîze û
ma em çi ne ku hûn li dijî me ga-
zincan dikin? 8 Û Mûsa got: Dema
XUDAN bona xwarina we êvarê
goşt û sibehê jî qandî hûn bixwa-
zin nan bide, hûnê bizanibin; ji ber
ku XUDAN xutxut kirina we, ya
ku hûn li dijî wî dikin bihîst. Ma
ka em kîne ku? Lê belê hûn ne li
dijî me, lê li dijî XUDAN xutxutê
dikin! 9 Û Mûsa ji Harûn re got:
Ji hemû civaka lawên Îsraêl re bi-
bêje: Nêzîkî hizûra XUDAN bibin;
ji ber ku wi gazincên we bihîstin.
10 Û wusa bû ku; dema Harûn ji
hemûya civaka lawên Îsraêl re got;
ber bi çolê ve nihêrtin. Û a vay,
mezinahiya XUDAN di ewran de
hate xuyanîbûn. 11 Û XUDAN bi
Mûsa re axifî û got: 12 Gilî û ga-
zincên lawên Îsraêl bihîstim; bi
wan re biaxife û bibêje: Hûn ê ber
êvarê goşt bixwin û sibehê jî bi nan
ve têr bibin û hûn ê bizanibin ku,
Xwedayê we, XUDAN ez im!
13 Û wusa bû ku, êvarê sûsikan
derketin û artêşgehê dagirtin û si-
behê xunav ketibû dora artêşgehê.
14 Û gava xunava ku ketibû rabû,
a vay, li erda çolê li ser erdê, tiştekî
mîna xasîvê gilover û biçûk hebû.

*Manna – Xwarina ku Xwedê da Gelê Xwe*

15 Û lawên Îsraêl dîtin û ji hev
û din re gotin: Gelo ev çî ye? Ji
ber ku nizanîbûn, ka ew çî ye. Û
Mûsa ji wan re got: Nanê ku XU-
DAN bona xwarina we daye ev e.
16 Tiştê ku XUDAN emir kiriye
ev e. Bila her yekê ji we, li gor
xwarina xwe, ji wê bide hev; mîna
ku serê her merivî omerekî[1], hûn
ê li gor hejmara canên xwe; her
yekî we, bona yên ku di çadirên
we de ne bistînin. 17 Û lawên Îs-
raêl wusa kirin û hinek kes zêde,
hinek kes jî kêm dan hev. 18 Û
gava bi omerê ve pîvan, ne zêde-
yiya yê ku pirr daye hev hebû û ne
jî kêmasiya yê ku hindik daye hev
hebû. Her kes, li gor xwarina xwe
dabû hev. 19 Û Mûsa ji wan re
got: Bila heta sibehê tu kes ji wê
nehêlin. 20 Lê belê Mûsa guhdarî
nekirin û hinek kesan ji wê, heta
sibehê hiştin û kurm ketê û gennî
bû û Mûsa bi wan ve hêrs bû.
21 Û ji sibehê, heta sibeha din
her yek, li gor xwarina xwe, ji
wê berhev kirin û dema roj germ
dibû, dihuliya. 22 Û wusa bû ku,
di roja şeşemîn de bona her yekî bi
du omerî, du qatî nan berhev kirin
û hemûyên serokên civakê hatin

[1] Li rasteka menan binêrin.

û agahî dan Mûsa. 23 Û ji wan re
got: Gotina XUDAN ev e: Sibê
roja saloxiyê ye, roja Sebtê ya ku
bona XUDAN pîroz, yê ku hûn ê
bikelînin, bikelînin û yê ku hûn ê
biheşînin, biheşînin û hemûyê ku
ji ber mayî jî, bona xwe ji bo hûn
heta sibehê veşêrin, rahêjin. 24 Û
mîna ku Mûsa emir kiribû, heta si-
behê wan veşartin û bêhn neketê
û di wê de kurmik tunebû. 25 Û
Mûsa got: Îroj, wê bixwin; ji ber
ku îro ji XUDAN re Sebt e; hûn
ê îro nikaribin ku wî li beyarê bi-
bînin. 26 Hûn ê şeş rojî wê berhev
bikin; lê belê roja heftemîn Sebt
e, dê di wê rojê de tune be. 27 Û
wusa bû ku, di roja heftemîn de, ji
netewê hin kes, bona berhevdanê
derketin û nedîtin. 28 Û XUDAN
ji Mûsa re got: Ma hûn ê heta
kengê nexwazin ku li gor emir û
zagonên min bikin? 29 Binêrin, ji
ber ku XUDAN Sebtê da we, bo
vêya di roja şeşan de, nanê we yî
du rojî dide we; bila her kes di cîhê
xwe de bimîne, di roja heftemîn
de tu kes ji cîhê xwe dernekeve!
30 Û netewe, di roja heftemîn de
rawestiyan.
31 Û mala Îsraêl, navê mannê li wî
kirin û ew mîna tova gijnîjê sipî
û tahma wê jî, mîna nanê şikeva
yê ku bi hungiv e, bû. 32 Û Mûsa
got: Tiştê ku XUDAN emir kiriye
ev e: Dema we ji welatê Misirê
derxistim, bona nifşeyan, ji bo
nanê ku bi we dame xwarin bi-
bînin, bila qasî omerekî ji wê bête
veşartin. 33 Û Mûsa ji Harûn re
got: Cêrekî[1] rahêje û qasî omerekî
manna têxe hundirê wê û ji bo ku
bona nifşeyên we bête veşartin, wî
deyne hizûra XUDAN. 34 Û mîna
ku XUDAN emir dabû Mûsa,
Harûn bona veşartinê wê danî ber
Şahdeyiyê. 35 Û heta ku hatin
warekî gelê Îsraêlê lê ne, çel salî
manna xwarin, heta ku hatin hidû-
da welatê Kenanê manna xwarin.
36 Û omerek ji deh parî, pariyekî
efayê[2] ye.

*Ava ku ji Zinarê ve derdikeve*

Zeb 78,15-16; 114,7-8; 1.Kor 10,4

17 Û hemûya civaka lawên Îs-
raêl, li gor emrê XUDAN,
ji çola Sînayê qonax bi qonax koç
kirin û li Refîdîmê qonax danîn û
ji netewê re ava vexwarinê tune
bû. 2 Û netewe bi Mûsa re ketin
keftûleftê û gotin: Ka avê bide me
ku em vexwin! Û Mûsa ji wan re
got: Ma çima hûn bi min re di-
kevin keftûleftê? Çima hûn XU-
DAN diceribînin? 3 Û netewe li
wir tî bûn û netewe li dijî Mûsa
dest bi gotinên gazincê kirin û go-
tin: Ma çima te me, lawên me û
heywanên me, bona ku ji tîbûnê

1 Şerbikekî.

2 Li rasteka menan binêrin.

bikuje, ji Misirê derxistin? 4 Û
Mûsa, ji XUDAN re qêriya û got:
Ma ka ez çi ji vî netewî re bikim?
Hinek din dê min bidin ber kevi-
ran!
5 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Derbasî pêşiya netewê bibe û
çend kalepîrên Îsraêlê tevî xwe
rahêje; çoyê ku te li çem xistibû
bigre destê xwe û bimeşe! 6 A vay,
ez ê li wir, li Horebê, li ser zinarê
li ber te bisekinim û tuyê li zinarê
bixe û bona ku netewe vexwe, dê
ji wê av derkevin. Û Mûsa li ber
çavên kalepîrên Îsraêl wusa kir.
7 Û navên Massa[1] û Merîba[2] li wir
kir, ji ber ku lawên Îsraêl ketin
keftûleftê û ji ber ku bi gotina:
Gelo XUDAN di nav me de ye, an
jî nîne? XUDAN ceribandin.

*Amalekî rastî Têkçûnê tên*

5.Mûs 25,17-19

8 Û Amalek hat û bi Îsraêlê re, li
Refîdîmê cengê kir. 9 Û Mûsa
ji Yêşû re got: Ji me re zilaman
hilbijêre û derkeve û bi Amalek re
cengê bike; sibê ez ê çoyê Xwedê di
destê min de, li serê girê bisekinim.
10 Û Yêşû, mîna ku Mûsa jê re
gotibû kir û bi Amalek re şer kir û
Mûsa û Harûn û Hûr derketin serê
girê. 11 Û wusa bû ku, dema Mûsa
destê xwe radikir, Îsraêl bi ser ve
diket û gava destê xwe dadixist,
Amalek bi ser ve diket. 12 Lê belê
destên Mûsa westiyan û kevirekî
rahiştin û danîn bin wî û li ser wê
rûnişt û Harûn û Hûr, yek ji vî alî,
yek jî ji aliyê din ve destên xwe bi
jor ve girtin û heta ku roj çû ava,
destên wan pêdandî[3] man. 13 Û
Yêşû, Amalek û netewa wî, bi
devê şûr ve şikand. 14 Û XUDAN
ji Mûsa re got: Vêya bi bîranîtî,
li pirtûkê ve binivîse û têxe guhê
Yêşû; ji ber ku ez ê Navê Amalek,
bi tûmî, ji rûyê erdê ve rakim[4]! 15 Û
Mûsa selexanayekê ava kir û navê
XUDAN-Nîssî[5]! lê kir. 16 Û got:
XUDAN sondê da; dê ji nifşeyan,
heta nifşan, cenga XUDAN bi
Amalek re hebe!

*Yetro serî li Mûsa dide*

2.Mûs 2,15-22; 4,18-26

18 Û xezûrê Mûsa, kahînê Mi-
dyanê Yetro, her tiştê ku
Xwedê bona Mûsa û netewa wî
Îsraêlê çêkirine û XUDAN çawa
Îsraêl ji Misirê derxistiye, bihîst.
2 Û xezûrê Mûsa Yetro, jina Mûsa
Tsîppora û her du lawên wî, yên
ku Mûsa wan şunda vegerandibûn
girt; 3 ku navê lawekî wî Gerşom
e; ji ber ku: Ez li welatê biyaniyê
xerîb im gotibû 4 û navê yê din
jî Elîezer e; ji ber ku: Xwedayê

1 Ceribandin.
2 Keftûleft, kişkisîn.
3 Sabît.
4 Ji rûyê erdê paqij bikim.
5 XUDAN ala min e.

bavê min, alîkarê min bû û min
ji şûrê Fîrawûn ve xelas kir go-
tibû. 5 Û xezûrê Mûsa Yetro, jin
û lawên wî, hatin cem Mûsa li çi-
yayê Xwedê, çola ku lê koç danî
bûn. 6 Û ji Mûsa re got: Xezûrê
te ez, Yetro, tevî jina te û bi wê
re her du lawên te hatin cem te.
7 Û Mûsa, bona ku pêrgîniyê ji
xezûrê xwe bike derket, xwar bû
û wî ramûsand û hal û xatir ji hev
re pirsîn û ketin çadirê. 8 Û Mûsa,
hemû tiştên ku XUDAN bona
xatirê Îsraêl, bi Fîrawûn û Misiri-
yan re kirine, hemû zehmeta ku di
rê de kişandine û xelasiya ku ka
XUDAN wan çawa xelaskirine,
ji xezûrê xwe re anî ziman. 9 Û
Yetro, ji hemû qenciyên ku XU-
DAN ji Îsraêlê re kirine, ji ber ku
wan ji destên Misiriyan xelas ki-
rine kêfxweş bû. 10 Û Yetro got:
Bila XUDANê ku we ji destên
Misiriyan û ji destên Fîrawûn xe-
las kiriye, pîroz bibe; wî netewê
ji bin destên Misiriyan xelas kir!
11 Niha ez dizanim ku, XUDAN
ji hemû îlahan mezintir e; ji ber
ku, di tiştê ku tê de qurre dibûn bi
ser wan ve ket! 12 Û xezûrê Mûsa
Yetro, pêşkêşî û qurbanên ku bona
Xwedê têne şewitandin stendin û
Harûn û hemû kalepîrên Îsraêlê,
tevî xezûrê Mûsa, bona ku di hi-
zûra Xwedê de nan bixwin, hatin.

*Şîreta Yetro*

5.Mûs 1,9-18; 16,18-20: 2.Dîr 19,4-10

13 Û wusa bû ku, Mûsa dotira
rojê bona ku daraziyê ji netewê
re bike rûnişt û netewe ji sibehê
heta êvarê li dora Mûsa sekinîbûn.
14 Û gava xezûrê Mûsa, her tiştên
ku ew bona netewê dike, dîtin,
got: Ev tiştê ku tu ji netewê re
dikî, çî ye? Ma çima tu tenê rû-
dinî û hemûya netewê, ji sibehê
heta êvarê li dora te dimînin? 15 Û
Mûsa ji xezûrê xwe re got: Ji ber
netewe, bona ku ji Xwedê ve bipir-
sin tên cem min; 16 her çi wext do-
zek wan hebe tên cem min û ez di
nava zilam û cîranê wî de daraziyê
didim û zagon û şerîetên Xwedê ji
wan re dibêjim. 17 Û xezûrê Mûsa
jê re got: Ev karê ku tu dikî, ne
karekî qenc e. 18 Him tu û him jî
ev netewa ku bi te re ye, muheqeq
hûn ê lawaz[1] bikevin; ji ber ku ev
kar bo te zehf giran e; tu nikarî wê
tenê bikar bîne. 19 Niha gotina
min guhdarî bike, ez şîretê bidim
te û bila Xwedê bi te re be: Tu bona
netewê li ber Xwedê be û tu dozan
bibe ji Xwedê re 20 û tuyê zagon
û şerîetan hînî wan bikî û rêya ku
bimeşin û karê ku bikin, nîşanî
wan bidî. 21 Û tu ji nav hemûya
netewê, zilamên ku bi huner in û
ji Xwedê ditirsin, zilamên ku ji qe-
zenca neçê dikerihin û yên rasteqî-
niyê ne amade bike û vana wekî bi
serokên hezaran, bi serokên sedan,

1 Zeîf.

bi serokên pênciyan û bi serokên
dehan li ser wan wezifedar bike[1].
22 Û bila her tim daraziyê li ser
netewê bikin û dê wusa bibe ku, dê
her dozek mezin ji te re bînin û ji
her dozên biçûk, dê bi xwe dara-
ziyê bidin[2] û dê ji te re hêsan bibe
û dê ew ê jî tevî te barê hilgirin.
23 Ger tu vî tiştî bikî, Xwedê jî emir
bide te, tuyê wê gavê bikaribî diyax
bikî û him jî dê hemûya ev netewe
jî bi dilxweşiyê bigihêje cîhê xwe!
24 Û Mûsa guh da gotina xezûrê
xwe û her tiştên ku got, anî cîh.
25 Û Mûsa, ji hemûya Îsraêlê zi-
lamên bihuner bijartin û wan li ser
netewê wekî bi seriyan, serokên
hezaran, serokên sedan, serokên
pênciyan û serokên dehan bibin
wezifedar kirin. 26 Û her tim da-
raziyê li netewê kirin; pirsgirêkên
dijwar anîn cem Mûsa; lê belê li
her pirsgirêka biçûk, wan bi xwe
daraziyê dan. 27 Û Mûsa xezûrê
xwe berda û ew çû welatê xwe.

*Îsraêlî li Çiyayê Sînayê*

5.Mûs 5,2; 7,6-8; 26,17-19

19 Di sê mehiya ku lawên Îs-
raêl ji welatê Misirê der-
ketibûn, di wê rojê de hatin çola
Sînayê. 2 Û gava ji Refîdîmê koç
kirin û hatin çola Sînayê, li çolê
kon danîn û Îsraêl li wir, li hem-
ber çiya konê xwe danî. 3 Û Mûsa
derket hizûra Xwedê û XUDAN
ji çiya bangî wî kir û got: Tuyê ji
mala Aqûp re wusa bibêje û tuyê
ji lawên Îsraêl re bigehîne: 4 We
dîtin ku min çi ji Misiriyan re ki-
rin û we çawa di bazikê qertel de
bar kirin[3] û ji xwe re anîm. 5 Û
niha, ger hûn, bi rastî jî gotina min
guhdarî bikin û bi peymana min
bigirin, hûn ê ji min re, ji hemû
neteweyan zêdetir û xastir bibin
netewe, ji ber ku hemû dinya ya
min e 6 û hûn ê ji min re bibin
qiraletiya kahînan û gelê pîroz.
Gotinên ku tuyê ji lawên Îsraêl re
bibêjî, ev in.
7 Û Mûsa hat û bangî kalepîrên
netewê kirin û hemû gotinên ku
XUDAN ji wî re emir kiribûn,
danîn ber wan. 8 Û hemûya nete-
wê pev re bersivê dan û gotin: Em
ê hemû gotinên XUDAN bikin! Û
Mûsa, gotinên netewê, ji XUDAN
re birin. 9 Û XUDAN ji Mûsa re
got: Bona ku, dema ez bi te re
biaxifim, bila netewe bibihîze û
abadîn bi te bawer bibe, a vay,
ez ê di nava ewrekî tarî de werim
cem te. Û Mûsa, gotinên XUDAN
gîhand netewê. 10 Û XUDAN ji
Mûsa re got: Here cem netewê û
wan îro û sibê pîroz bike û bila
kincên xwe bişon 11 û bila bona

1 An jî: Li ser wan dayne.
2 ew ê di nava xwe de safî bikin, an jî: Daraziyê bikin.
3 Kişandim û ji xwe re anîm.

roja sêwemîn amade bin; ji ber ku
di roja sêwemîn de, dê XUDAN
li ber çavên hemû netewê ji ser
Çiyayê Sînayê ve dakeve. 12 Û li
dorê, tuyê sînorê ji netewê re bibi-
re û bibêje: Qet dernekevin çiyê û
nêzîkê qûntara çiyê jî nebin! Ji ber
kî ku destê xwe bide çiya, dê mu-
heqeq bête kuştin! 13 Dê dest li wî
kesî nê xistin, lê belê dê muheqeq
bête kevir kirin[1], an jî bi tîrê ve
bê lêxistin; dixwaze bila heywan
bibe an jî mirov be, dê nikaribe
bijî[2]; dema borî bi dirêjî bê kutan,
ew ê derkevin çiyê! 14 Û Mûsa, ji
çiyê daket cem netewê û netewê
pîroz kir û wan kincên xwe şuştin.
15 Û ji netewê re got: Bona roja
sêwemîn amade bin; nêzîkî pîrekê
nebin!
16 Û wusa bû ku, di roja sêwemîn
de dema bû sibe, gurmîniya ezma-
nan û birûsk û li serê çiyê ewrek
tarî û dengekî gellekî bilind yê bo-
riyê bû û hemûya netewê, yê ku
li artêşgehê ne, lerizîn. 17 Û bona
ku pêrgîniyê ji Xwedê re bikin,
Mûsa netewê ji arteşgehê derxist
û li pala çiyê sekinîn. 18 Û Çiyayê
Sînayê, tim dû dikir, ji ber ku XU-
DAN, di nava agir de daketibû ser
wê û dûyê wê, mîna tifikê derdi-
ket û hemûya çiyê gellekî hejiya.
19 Û gava dengê boriyê her ku
çû bilind bû, Mûsa got û Xwedê
bideng bersivê da wî. 20 Û XU-
DAN daket ser Çiyayê Sînayê, ser
girê çiyê û XUDAN, Mûsa bangî
girê çiyê kir; Mûsa jî derket. 21 Û
XUDAN ji Mûsa re got: Dakeve,
temmiyê li netewê bike, bila qet
bona dîtinê, sînorê ber bi aliyê
XUDAN derbas nebin û gellekê ji
wan, bila nekevin. 22 Û kahînên
ku nêzîkî XUDAN tên, bila xwe
pîroz bikin, da ku, XUDAN êrîşî
wan neke! 23 Û Mûsa ji XUDAN
re got: Netewe nikare derkeve Çi-
yayê Sînayê; ji ber ku te bi gotina:
Sînorê deyne ber çiyê û wê pîroz
bike temmiyê li me kir! 24 Û XU-
DAN jê re got: Here, dakeve û tu
û bi te re Harûn, hûn ê hilkişin, lê
belê bila netewe û kahînan, bona
ku hilkişin cem XUDAN derbas
nebin, da ku, ew êrîşî wan neke!
25 Û Mûsa daket cem netewê û ji
wan re got.

*Deh Emir*

5.Mûs 5,2-22; Met 22,37-40; Yû 1,17

20 Û Xwedê, hemûyên van
gotinan axifî û got:
2 Xwedayê te XUDAN, yê ku te
ji welatê Misirê, ji mala hêsîriyê
derxistiye ez im.
3 Li hemberê min, dê îlahên te
yên wekî din tune bin!
4 Tuyê bona xwe senemê qewartî
û tu wêne, ên li ezmana ne, an jî

1 Recimandin.

2 Dê ew nejî.

li jêr, li erdê ne, an jî di bin erdê
de, di avê de ne, qet çê neke 5 û
ji wan re xwar nebe û peristinê ji
wan re neke; ji ber ku ez, Xwe-
dayê te XUDAN, ez Xwedayek
ûsa çavnebar im ku, ji yên ku ji
min dikerihin, gunehên bava li ser
zarokan, li ser nifşeya sêwemîn û
di nifşeyên çaremîn de digerim 6 û
bi hezaran ji yê ku ji min hez dikin
û emirên min tînin cîh re jî xêr û
xweşiyê dikim.
7 Tuyê navê Xwedayê xwe XU-
DAN, bêsedem negre devê xwe;
ji ber ku XUDAN, dê kesê ku
navê wî bêsedem bigre devê xwe
bêsûc nehêle.
8 Bona ku tu roja Sebtê pîroz bikî,
wê di bîra xwe de bigire! 9 Tuyê
şeş rojî bixebite û hemû karê xwe
bike; 10 lê belê roja heftemîn, ji
Xwedayê te XUDAN re Sebt e; tu
û lawê xwe û qîza xwe, dîl û cari-
ya xwe û heywanên xwe û xerîbê
ku li ber deriyê te ye, tu karî nekin.
11 Ji ber ku XUDAN ezmanan,
erdê û behrê û hemû tiştên ku di
wan de ne, di şeş rojan de afiran-
din û di roja heftemîn de rawesti-
ya; bo vê yekê, XUDAN roja Seb-
tê bi pîrozî danî û wê pîroz kir.
12 Ji dayik û bavê xwe re hurmetê
bike, da ku, bila di axa ku Xwe-
dayê te XUDAN dide te de, teme-
na te dirêj bibe.
13 Tuyê nekuje[1]!
14 Tuyê zinê neke!
15 Tuyê nedize[2]!
16 Tuyê li dijî cîranê xwe,
şahdeyiya derewîn neke!
17 Tuyê çav bernede mala cîranê
xwe; jina cîranê xwe, an jî dîlê wî,
an jî cariyê wî, an jî gayê wî, an jî
kerê wî, tuyê çav bernede tu tiştê
cîranê xwe!
18 Û hemûya netewê, gurmîniyên
ezmanan û birûskan û dengê bori-
yê û bi dûbûna çiyê dîtin û dema
netewe dît, lerizîn û li dûr ve se-
kinîn. 19 Û ji Mûsa re gotin: Were,
bi me re biaxife û em guhdarî
bikin; lê belê bila Xwedê bi me re
neaxife, da ku, em nemirin!
20 Û Mûsa ji netewê re got: Me-
tirsin, ji ber ku Xwedê bona ku
we biceribîne û tirsa we li pêşiya
we be hat! 21 Û netewe li dûr ve
sekinîn û Mûsa nêzîkî reştariya
ku Xwedê tê de yî bû.
22 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Tuyê ji lawên Îsraêl re wusa bi-
bêje: We dîtin ku ez ji ezmanan ve
bi we re axifîm. 23 Hûn ê digel
min, îlahên din çênekin; ji bo xwe
ji zîv îlahan, ji zêr îlahan çêne-
kin. 24 Tuyê bona min ji axê ve
selexanê ava bike, qurbanên xwe
yên şewitandinê û pêşkêşiyên
dilxweşiyê, mîhên xwe û gayên
xwe li ser wê qurban bike; li her

1 Nekuje, an jî: Qetl neke.

2 Diziyê neke.

cîhê ku navê xwe di bîrbînim ez ê werim cem te û te pîroz bikim. 25 Û ger tu bo min, ji kevirê selexanê çêbike, tu wê ji kevirên hatine şeh kirin[1] çê neke, ji ber ku ger tu qelema xwe lêxê, tuyê wê mindar bikî. 26 Û li ser wê, bona ku tazîbûna te venebe, tuyê bi pêlikan dernekeve selexana min!

*Têkiliyên bi Dîlan re*

5.Mûs 15,12-18; 21,1014

21 Û daraziyên ku tuyê deyne ber wan, ev in:
2 Ger tu dîlek Îbranî bistîne, dê şeş salî xizmetê bike û di sala heftemîn de dê bê berdêl azad bibe[2].
3 Ger tenê hatibe, dê tenê derkeve; ger bi jina xwe re hatibe, wê gavê dê jina wî jî bi wî re derkeve. 4 Ger efendiyê wî jinekî bide wî û ew jê re lawik an jî qîzikan bîne dinê, dê jin û zarok bibin yên efendî û ew ê bi xwe, tenê derkeve. 5 Lê belê ger dîl bi eşkeretî bibêje: Ez ji efendiyê xwe, ji jina xwe û zarokên xwe hez dikim, ez naxwezim azad bibim! 6 Dê efendiyê wî, wî nêzîkî Xwedê bike û nêzîkî derî an jî şêmûga derî bike û guhê wî bi dirêşê[3] qul bike û dê abadîn xizmetê jê re bike.
7 Û ger zilamek qîza xwe bi cariyetî bifroşe, ew ê mîna ku dîl derdikevin dernekeve. 8 Ger qîza ku pê re dergistî bûyî, di çavên efendiyê xwe de xerab bikeve, wê gavê dê bona ku bê firotan wê vegerîne; ji ber ku pê re dilsoz nemayiye, nikare wê bifroşe neteweyek biyan. 9 Û ger bi lawê xwe re dergistî bike, bila jê re li gor usila qîzan bike. 10 Ger ji xwe re pîrekekê din bistîne, dê nifqe, kinc û mafên jinantiya ya berê kêm neke. 11 Û ger van her sê tiştan ji wê re neke, dê wê gavê bêberdêl, bêpere derkeve.

*Zagonên li dijî tundiyê*

4.Mûs 35,16-34

12 Yê ku li zilamekî bixe, ger zilamê ku hatiye lêxistin bimire, dê bi biryarî bête kuştin. 13 Û ger kemînê navêje, lê belê Xwedê wî bide destê wî, dê wê gavê ew ê bireve cîhê ku ez tayîn bikim.
14 Ger zilamek bona ku bi fenekiyê bukuje, bi betranî bi ser cîranê xwe ve here, tuyê bona ku wî bukujî heta ji selexana min jî bistîne!
15 Û yê ku li diya xwe an jî li bavê xwe bixe, dê bi biryarî bête kuştin.
16 Û yê ku mirov birevîne, dixwaze wî firoti be an jî di destê wî de be, dê bi biryarî bête kuştin.

---

1 Traş kirin, an jî: Xeritandin.
2 Kar berde, an jî: Azad derkeve.
3 Hesinê ku destê wî text, bi pirranî pêlavvan, bi dirêşê (bîzê) ta di derziyê de radikin, serê wî tûj û bi çenqel e.

17 Û yê ku ji diya xwe an jî ji bavê
xwe re naletê bike, dê bi biryarî
bête kuştin.
18 Û ger zilam bikevin keftûleftê
û zilamek bi kevir an jî bi kulmika
xwe li cîranê xwe bixe û yê ku ha-
tiye lêxistin nemire, lê belê bikeve
nav livînan; 19 rabe û bi gopalê
xwe li derve bigere, wê gavê dê
yê ku li wî xistiye, bê sûc bibe; lê
dê berdêla dema ku winda kiriye
bide û wî bitûmî tedawî bike.
20 Ger zilamek bi ço li dîlê xwe
an jî cariya xwe bixe û di bin destê
wî de bimire, dê bi biryarî bête
ceza kirin. 21 Lê belê rojekê an jî
du rojî bijî, dê neyê ceza kirin; ji
ber ku ew malê wî bi xwe ye.
22 Û ger zilam şer bikin û li
pîrekek ducanî kevin û zarokê wê
ji ber wê here û ger xesarek nebe,
mîna ku mêrê wê li ser wî tayîn
bike, dê xesarê[1] bike û bi navdîtiya
serweran bidê. 23 Lê belê ger xe-
sar bibe, wê gavê dê li dêvila canê,
can, 24 li dêvila çavê, çav, li dêvila
diranê, diran, li dêvila dest, dest, li
dêvila ling, ling, 25 li dêvila şewtê,
şewwat, li dêvla birînê, birîn, li
dêvla qusînê jî tuyê qusînê bide.
26 Û ger zilamek li çavê dîlê xwe
an jî li çavê cariya xwe bixe û wê
seqet bike, li dêvila çavê wî dê wî
azad berde. 27 Û ger diranê dîlê
xwe an jî cariya xwe bixîne, li dê-
vila diranê wê, dê wê azad berde.
28 Û ger gayek zilamekî an jî
pîrekekî qiloç bike[2] û ew bimire,
divê ga bi biryarî bê recimandin û
goştê wî neyê xwarin û dê xwe-
diyê gayê bê sûc be. 29 Lê belê
gayek ji berê de bi qiloçan êrîş
dike hebe û ji xwediyê wî re hati-
be gotin û wî ga zeft nekiribe û ga
dema zilamekî an jî pîrekekê biku-
je, wê gavê dê ga bête recimandin
û xwediyê wî jî bê kuştin. 30 Ger
fidye li ser wî hatibe danîn, wê
gavê berdêl her çi be, divê wekî
fidya canê xwe bidê. 31 Divê law
qiloç kiribe an jî divê qîzê qiloç
kiribe, dê jê re li gor vê hukmê bê
kirin. 32 Ger ga, dîlekî an jî cari-
yekî qiloç bike, dê sîh şekel zîv ji
efendiyê wan re bête dayîn û ga
bê recimandin.
33 Ger zilamek kortalekî veke,
an jî zilamek kortalê bikole û wê
nexumîne û gayek an jî kerek
bikeve wir, 34 dê xwediyê kor-
talê berdêla wî bide; dê pere bide
xwediyê wan û dê heywanê mirî
bibe yê wî.
35 Û ger gayê zilamekî, gayê
cîranê wî biêşîne û ew jî bimire,
wê gavê divê gayê zindî bifroşin
û perê wî li hev par bikin. Û hey-
wanê mirî jî par bikin. 36 An jî
gayek ji berê de bi qiloçan êrîş
dike hebe û bête zanîn ku ji xwe-

1 Ziyan, tezmînat, an jî: Bertîl.

2 Bi qiloçên xwe lêxe.

diyê wî ga zeft nekiribe, muheqeq
li dêvla gayê, divê ga bide û dê
heywanê mirî bibe yê wî.

*Zagonên di derbarê Mal de*
2.Mûs 20,15; 3.Mûs 5,21-26

22 Ger zilamek ga an jî mîh
bidize û wê serjê bike an
jî bifiroşe; divê li dêvla gayekî
pênc ga û li dêvla mîhekî çar mîhî
bide. 2 Ger dizek, dema dîwarê
qul dike bê girtin û bête kuştin bo
wî, mafê xwînê nîne. 3 Ger li ser
wî roj hilatibe, dê bona wî mafê
xwînê hebe; muheqeq wê bide;
ger tiştekî wî tune be, wê gavê dê
bona dizekiya xwe bête firotan. 4
Ger tiştê ku dizî be, dixwaze bila
ga bibe, ker bibe, an jî mîh bibe,
ger bi zindîtî di destê wî de bê
dîtin, dê du qatî bide.
5 Ger zilamek di zeviyekê de, an
jî di rezekê de bona ku biçêre,
heywanê xwe berde û ew di zevi-
ya yekî din de biçêre; dê ew ji herî
qenca zeviya xwe, ji herî qenca
rezê xwe bide.
6 Ger agir derkeve û bighêje ke-
leman û komên demedan, an jî
zad, an zevî bişewite, dê yê ku
agir pêxistiye, bi biryarî berdêla
wê bide.
7 Ger zilamek, bona ku veşêre
pere an jî mal bide cîranê xwe û
ew ji wir[1] bên dizîn; ger diz bê
girtin, dê muheqeq du qatî bide.
8 Ger diz neyê dîtin, dê xwediyê
malê gelo cîranê wî dest dirêjî
malên wî kirine an jî nekirine
bibîne, dê nêzîkî Xwedê bibe.
9 Di derheqê biryara her sûcî de,
di derheqê ga, an ker, an mîh û an
kinc de; di derheqê her tiştên ku
mirovek bibêje: Pertalê[2] windayî
ev e! de dê doza her duyan were
cem Xwedê; kesê ku Xwedê wî
sûcdar kiriye, dê du qatî bide
cîranê xwe.
10 Ger zilamek bona ku veşêre,
ker, an jî ga, an jî mîh, an jî hey-
wanekî din bide cîranê xwe û ew
bimire, an jî seqet bibe, an jî, berî
ku kes bibîne bête ajotin; 11 der-
barê ku dest dirêjî malê cîranê
xwe nekiriye, dê sonda XUDAN
di nava wan herduyan de be û dê
xwediyê malê qebûl bike û zilam
nede. 12 Û ger ji cem wî hatibe
dizîn, dê ew ê berdêlê bide xwe-
dî. 13 Ger perçe perçe bûbe, bila
bona şahdeyiyê wê bîne, dê yê ha-
tiye perçe kirin nede.
14 Û ger zilamek, tiştekî bi deyn
ji cîranê xwe bistîne û dema ku
xwediyê wê ne pê re be seqet bibe,
an jî bimire, dê ew ê muheqeq
berdêlê bide. 15 Û ger xwedî pê
re be, dê ew ê berdêlê nedê; ger
ew hatibe kirê kirin, dê bi berdêla
kirêya wê bê hesibandin.

1 Yanê ji mala cîran.
2 Alavê.

*Berpirsiyariyên Civakî*

5.Mûs 22,28-29; 5.Mûs 13

16 Û ger zilamek, qîzek ku hîn
dergîstî nebûye, bixapîne û pê re
rakeve, ew ê bibe jina wî, dê bi
biryarî bo wê giranî bide. 17 Ger
bavê wê nexwaze ku qîza xwe
bide wî, dê li gor giraniya ku di-
din keçikan, pere bide.
18 Tuyê nehêle ku pîreka sêrbaz
bijî!
19 Her kesê ku bi heywanan re ra-
keve[1], dê bi biryarî bête kuştin.
20 Tenê yê ku ji îlahekî xeynî
XUDAN re qurbanê serjê bike, dê
bê helaq kirin. 21 Tuyê neheqiyê
li kesê xerîp meke û jê re sitemka-
riyê[2] meke; ji ber ku hûn li welatê
Misirê xerîb bûn. 22 Divê hûn qet
jinebiyekê an jî sêwiyekî neêşînin.
23 Ger tu wan biêşîne û bi vê rêyê
ji min re biqêrin, ez ê muheqeq
qêrînên wan bibihîzim. 24 Û hêr-
sa min dê sor bibe û ez ê we bi
şûr ve bukujim û dê jinên we bî û
zarokên we jî sêwî bibin[3]!
25 Ger tu perê bi deyn bide netewa
min, bide xizanekî ku li cem te yî,
tuyê jê re nebe yê selefxwar[4] û divê
hûn selefê daneynin ser wî. 26 Ger
tu bi berdêlî[5], eba cîranê xwe rahêje,
berî ku roj biçe ava, divê tu wê ve-
gerîne; 27 ji ber ku ew pêçeka wî
ya tekane ye, bona çermê wî kincê
wî ye; ma bê wê ew çawa rakeve?
Û dê wusa bibe ku, dema ji min re
biqêre ez ê bibihîzim; ji ber ku ez
sayedar[6] im.
28 Divê tu kifrê ji Xwedê re meke û
ji yê ku serokê netewa te yî re naletê
meke! 29 Divê tu di pêşkêşkirina
zadê xwe û ya ku mahsera te dihe-
rikîne de nekeve derengiyê. Tuyê
ji lawên xwe, yê ku pêşiyê bûyiye
bidî min. 30 Di derheqê gayên xwe
de û di derheqê mîhên xwe de tuyê
wusa bike; dê heyşt roj tevî diya
xwe bimîne û di roja heyştemîn
de tuyê wî bide min! 31 Hûn ê ji
min re bibin zilamên pîroz; bo vê
yekê divê hûn goştê ku li çolê ha-
tiye perçe kirin nexwin; hûn ê wê
bavêjin ji kûçikan re.

*Zagonên Dadî û Rastiyê*

M.Sil 19,5.9; 3.Mûs 19,15-18;
5.Mûs 19,16-20

23 Tuyê agahiya derewîn
nekişîne; bona ku bibe
şahdeyê neheq, dest nede yê xe-
rab! 2 Divê bona xerabiyê, tu li
pêy zêdeyiyê nebe û di dozekê de
bona xera kirina dadiyê li pêy zê-
deyiyê neçe û nebêje 3 û di doza
wî de, cihêtiyê ji yê xizan re meke.
4 Ger tu rastî gayê windayî, an jî
kerê windayî yê neyarê xwe were,
muheqeq divê tu wî jê re vegerîne.

1 Yanê cimê bike.
2 An jî: Zulmê meke.
3 An jî: Zarokên we jî sêwî bimînin.
4 An jî: Nebe yê ku bi selefê danûstendinê dikî.
5 Bi rehînî.
6 Xêrkir im.

5 Ger tu kerê yê ku ji te dikerihe,
di bin barê xwe de ketiye bibîne,
wî bi halê wî ve li ber danê xwe
biparêze[1]; tevî wî bi biryarî tuyê
wî xelas bike!
6 Divê tu di doza wî de mafê xizan
çewt meke. 7 Ji tiştê derew ve dûr
bimîne û yê bêsûc û yê salih mekuje;
ji ber ku ez yê xerab bêsûc nahesibî-
nim. 8 Û divê tu bertîlê nestîne; ji
ber ku bertîl, çavên yê ku dibînin kor
dikin û gotinên salihan dizivirînin.
9 Û divê tu zulmê li yê xerîb meke;
hûn bi dilê xerîb dizanin, ji ber ku
hûn li welatê Misirê xerîb bûn.
10 Û tuyê şeş sal erdê xwe biçîne û
zadê xwe bide hev, 11 lê belê di sala
heftemîn de, divê tu wê rehet û vala
bihêle, da ku, bila xizanên netewa
te bixwin û yên ku wan hiştine jî dê
heywanên beyarê bixwin. Tuyê di
derheqê zeytûngeh û rezê xwe de jî
wusa bike. 12 Tuyê şeş rojî karên
xwe bike û di roja heftan de, bona
ker û gayê te rehet bikin û lawê ca-
riya te û xerîb rawestin, tuyê rawes-
tinê bike. 13 Û ji her tiştên ku ji we
re dibêjim, xwe biparêzin û navê
îlahekî din di bîra xwe de neynin û
bila ji devê te neyê bihîstin!

*Sê Cejn*

2. Mûs 34,18-16; 5.Mûs 16,1-17

14 Tuyê salê sê carî ji min re cejnê
bike. 15 Tuyê cejna nanê bêha-
vên bigire; mîna ku ji te re emir
kiribûm, di dema bijartî ya meha
Abîbê de tuyê heft rojî nanê bêha-
vên bixwe, ji ber ku tu di wê mehê
de ji Misirê derket û divê tu kes li
ber min dest vala neyê xuyabûn.
16 Û tuyê cejna çinandina pêşî ya
zadên te, yên karên ku te di zevi-
yê de çandibû û di dawiya salê de,
dema tu karên xwe yên ku berhev
dikî, cejna berhev kirinê bigire.
17 Hemû zilamên te, dê di salê
sê carî li ber Xudan, XUDAN de
bên dîtin!
18 Divê tu xwîna qurbanê xwe,
bi nanê bihavên ve pêşkêş neke
û divê rûnê cejna te heta sibehê
şevînî nebe. 19 Tuyê nûberê zevi-
ya xwe bîne mala Xwedayê xwe
XUDAN. Tuyê karikê di şîrê diya
wê de nekelîne!

*Milyaketê Xwedê Pêşengiyê dike*

20 A vay, ez di rê de bona ku te
biparêzim û te bînim cîhê ku ama-
de kirime, ji pêşiya te milyaketekî
dişînim. 21 Li ber wî xwe biparê-
zin[2] û gotina wî guhdarî bikin; li
dijî wî di berxwe de nedin; ji ber
ku dê sûcê we efû neke; ji ber ku
navê min di wî de ye. 22 Lê belê
ger bi rastî tu gotina wî guhdarî
bike û hemû tiştên ku ez dibêjim
bîne cîh; wê gavê ez ê ji neyarên
te re bibim neyar û ji dijminên te re

---

1 An jî: Tuyê wî bi wî halê wî ve bernede.

2 Bi xwe bikaribin.

bibim dijmin. 23 Ji ber ku dê milyaketê min di pêşiya te de here û dê te bibe nava Amoriyan, Hîttiyan û Perîzziyan û Kenaniyan û Hîviyan û Yebûsiyan û ez ê wan helaq bikim. 24 Divê tu ji îlahên wan re secde meke û tu peristinê ji wan re meke û li gor karên wan meke; lê belê divê tu wan bitûmî, xera bike û kevirên wanî çikandî perçe perçe bike. 25 Û hûn ê ji Xwedayê xwe XUDAN re peristinê bikin û dê nanê te û ava te bi bereket bike û ez ê nexweşiyê ji nav te rakim. 26 Dê li welatê te de pîreka stewr û zarok ji ber wê diçe tune be û ez ê hejmara rojên te temam bikim. 27 Ez ê rewnaqiya xwe di pêşiya te de bişînim û hemû neteweyên ku tuyê bi ser wan ve biçe perîşan bikim û hemû neyarên te dê ji ber te birevin. 28 Û ez ê mozkeran ji pêşiya te de bişînim û dê ew Hîviyan û Kenaniyan û Hittiyan ji ber te biqewirînin. 29 Bona ku welat wêran nebe û li ser te, heywanên beyarê zêde nebin, ez di nava salekê de wan ji ber te naqewirînim. 30 Heta ku tu bi bereket be û welat bi mêrasî bigire ez ê kêm û kêm wan ji ber te biqewirînim. 31 Û ji Behra Gewez, heta behra Filistiyan û ji çolê heta çemê Feratê, ez ê sînorê ji te re deynim; ji ber ku ez ê gelê welêt, bidim destên we û tuyê wan ji ber xwe biqewirîne. 32 Tuyê bi wan û îlahên wan re peymanê çêneke! 33 Bona ku li dijî min sûkkirinê bi te nedin kirin, dê ew di welatê te de rûnenin; ji ber ku ger tu ji îlahên wan re peristinê bikî, dê muheqeq ji te re bibe dafik!

*Peyman tê tesdîq kirin*

24 Û ji Mûsa re got: Tu û Harûn, Nadab û Abîhû û heftê kes, ji kalepîrên Îsraêlê, derkevin[1] cem XUDAN û ji dûr ve secde bikin 2 û dê Mûsa, tenê nêzîkî XUDAN bibe; lê belê ew ê nêzîk nebin û dê netewe tevî wî dernekevin! 3 Û Mûsa hat û hemû gotin û hemû daraziyên XUDAN ji netewê re got û hemû netewe, bi dengekî bersivê danê û gotin: Em ê hemû gotinên ku XUDAN gotiye bikin! 4 Û Mûsa, hemû gotinên XUDAN nivîsand û sibehê rabû û li pala çiya selexaneyek û li gor donzdeh eşîrên Îsraêlê donzdeh sitûnên kevirîn[2] danîn. 5 Û ji lawên Îsraêl xortan şandin û pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş kirin û bona pêşkêşiyên dilxweşiyê ji XUDAN re ganêran serjê kirin. 6 Û Mûsa nêviyê xwînê rahişt û xist leganan û nêviyê xwînê li ser selexanê ve reşand. 7 Û wî kitêba peymanê rahişt û li ber netewê xwend û wan gotin: Em ê hemû gotinên XUDAN

1 An jî: Hilkişin hizûra XUDAN.

2 Kevirên bîranînê.

bikin û guhdarî bikin! 8 Û Mûsa
xwînê rahişt û li ser netewê reşand
û got: A vay, di derheqê hemûyên
van gotinan de, xwîna peymana ku
XUDAN bi we re daniye!
9 Û Mûsa û Harûn, Nadab û
Abîhû û heftê kes, ji kalepîrên Îs-
raêlê, derketin 10 û Xwedayê Îs-
raêlê dîtin û di binya lingên wî de,
mîna raxêrek ji tuxleyên yaqûtê
ve, tiştekî bi ronahî, tiştekî mîna
ezmanê rasteqîn hebû. 11 Û dest
li biesilên lawên Îsraêl nexist û
Xwedê dîtin û xwarin û vexwarin.
12 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Hilkişe çiya, cem min û li wir be
û ez ê lewhayên kevirîn û zagon
û emirên ku nivîsandime, bona ku
tu bidî fêr kirin, ez ê wan bidim
te! 13 Û Mûsa û xizmetkarê xwe
Yêşû rabûn û Mûsa hilkişiya çi-
yayê Xwedê. 14 Û ji kalepîran re
got: Heta ku ez vegerim cem we,
hûn li vir bisekinin û a vay, Harûn
û Hûr li cem we ne; ger doza kesekî
bibe, bila here cem wan! 15 Û Mûsa
derket çiyê û ewr çiya nuxumand.
16 Û rewnaqiya[1] XUDAN li ser Çi-
yayê Sînayê sekinî û ewr, şeş roj wî
nuxumand û di roja heftemîn de ji
nava ewrê de bangî Mûsa kir. 17 Û
di çavên lawên Îsraêl de xuyabûna
rewnaqiya[2] XUDAN, mîna agirekî
ku dixwe û diqedîne bû. 18 Û Mûsa
ket nav ewrê û hilkişiya çiyê û Mûsa
çel roj û çel şev li çiyê ma.

*Diyariyên bona Çadira Hevdîtinê*

2.Mûs 35,4-29

25 Û XUDAN ji Mûsa re axi-
fî û got: 2 Ji lawên Îsraêl re
bibêje; bila pêşkêşiyan ji min re
bînin; hûn ê ji her zilamê ku ji dilê
xwe dide, pêşkêşiya min bistînin!
3 Û pêşkêşiyên ku hûn ê ji wan
bistînin ev in: Zêr û zîv û tûnc 4 û
kitanê lacîwerd û erxewanî û sor û
zirav û mûyê bizinê, 5 eyarên sor
boyaxkirî yên beranan û eyarên del-
fînê û darên darcêwiyê[3], 6 bo qen-
dîlê rûn û bona rûnê meshê û gunu-
ka bêhnxweş, buharat, 7 kevirên
heqîqê û bona efod û bona sînggehê
kevirên firisandinê. 8 Û bona ku ez
di nav wan de rûnim, bila bona min
cîhekî pîroz çêbikin. 9 Wekoka xa-
niyê û wekoka hemû taximan, li gor
her tiştên ku ez nîşanî te bidim, hûn
ê wusa çêbikin.

*Sindoqa Peymanê*

2.Mûs 37,1-9

10 Û dê ji darcêwiyê sindoqekê
çêbikin; dirêjiya wê du gez[4] û nîv
û firehiya wê gezek û nîv û dê
bilindahiya wê gezek û nîv be.
11 Û tuyê rûyê wê bi zêrên xalis
ve bigire, tuyê rûyê wê ji hundir

---

1 Pîroziya XUDAN.
2 Pîroziya XUDAN.
3 Akasya.
4 Li rasteka menan binêrin.

û der ve bigire û di ser wê, li dora
wê tuyê perwaza zêrîn çêbike.
12 Û bo wê, tuyê çar xeliqên zêr
birijîne û wan têxe çar lingên wê û
dê du xelik li aliyekî wê û du xelik
li aliyê wê yî din be. 13 Û tuyê ji
darcêwiyê piyan jê re çêbike û rûyê
wan bi zêr ve bigire. 14 Û bona ku
sindoqê bibe, tuyê piyan derbasî
wan xelikana bike. 15 Dê pî di xe-
likên sindoqê de bimînin û jê neqe-
tin. 16 Û tuyê şahdeyiya ku bidim
te têxe hundirê sindoqê. 17 Û tuyê
ji zêra xalis, rûberek kefaretê çê-
bike; dê dirêjiya wê gezek û nîv û
firehiya wê gezek û nîv bibe. 18 Û
tuyê ji zêran ve du kerûbiyan[1] çê-
bike; wan mîna karên xalker, li her
du aliyê rûberên kefaretê çêbike.
19 Û li seriyekî kerûbiyek û li se-
riyê din kerûbiyek çêbike; hûn ê
kerûbiyên li her dû aliyî, tevî rûberê
kefaretê, mîna perçeyekî çêbikin.
20 Û dê kerûbî, wecê wan li dijî
hev, bi bazikên xwe rûberê kefaretê
buxumînin û dê bazikên xwe ber bi
jor ve vekin; dê wecê kerûbiyan,
ber bi rûberê kefaretê be. 21 Û tuyê
rûberê kefaretê deyne ser sindoqê
û şahdeyiya ku ez ê bidim te, têxe
hundirê sindoqê. 22 Û ez ê li wir,
werim cem te û bona lawên Îsraêl,
ez ê emiran bidim te, di derheqê
hemû tiştan de, ez ê ji ser rûberê
kefaretê, ji nav her du kerûbiyên ku
li ser Sindoqa Şahdeyiyê ne bi te re
peyvînê bikim.

*Maseya ku li ser nan tête pêşkêşkirin*

2.Mûs 37,10-16

23 Û tuyê ji darcêwiyê sifreyekê çê-
bike; dê dirêjiya wê du gez, firehi-
ya wê gezek û bilindahiya wê ge-
zek û nîv be. 24 Û tuyê dora wê bi
zêrê safî ve bigire û li dora wê, tuyê
perwazek zêrîn jê re çêbike. 25 Û
li dora wê, tuyê dorberek qasî çar
tilîkê jê re çêbike û tuyê ji qeraxa
dorberê re, perwazekî zêrînî çêbi-
ke. 26 Û tuyê bona wê çar xelikên
zêrînî çêke û xelikan deyne her çar
qozîkên ku li ser her çar lingî ne.
27 Bona kişandina sifrê, ji bo cîhên
ku mil tê de herin, dê xelik nêzîkî
qeraxa bibin. 28 Û tuyê piyan ji
darcêwiyê ve çêbike û dora wan bi
zêr ve bigire û dê sifre bi wan ve
bête kişandin. 29 Û tuyê sehenkên
wê û kefçiyên wê û cêrên wê û
bona pêşkêşiyên rijandinê tasên wê
çêbike; tuyê wan ji zêrê safî ve çê-
bike. 30 Û tuyê nanê aramiyê her
tim deyne ber min, ser sifrê.

*Qendîlgeh*

2.Mûs 37,17-24; Pey 1,12

31 Û tuyê ji zêra safî, şimadankekê[2]
çêbike; dê ling û dîregê şimadankê,

---

1 Milyaketên mezin û bihêz, yên ku nêzîkî Xwedê ne, an jî li ber wî ne.

2 Mûmdank, şamdank.

karê xalkerî bibin; qedeh û pîvok û çîçegên wê ji wê bin 32 û dê sê mil ji vî alî û sê mil jî ji aliyê din, şeş milên şimadankê hebin; 33 li aliyekî sê qedehên mîna çîçega bihîvê û li aliyê din sê qedehên mîna çîçega bihîvê û pîvokek û çîçegek hebe; dê heft milên ku ji şimadankê derdikevin, wusa bin: 34 Û di şimadankê de çar milên mîna çîçega bihîvê, pîvokên wê û çîçegên wê hebin 35 û bona şeş milên ku ji şimadankê derdikevin, li bin du milî pîvokek ji xwe û li bin du milî pîvokek ji xwe û li bin du milî pîvokek ji xwe hebin. 36 Dê pîvok û milên wê, ji wê bin; hemû ji karê xalker û ji zêrê safî bin. 37 Û tuyê qendîlên wê, heft hebî çêbike û bona ku ronahiyê bide hember xwe, dê qendîlên wê vêxin. 38 Û dê meqes û teblên wê ji zêrê safî bibin. 39 Tevî hemû van taximana, dê talantek[1] ji zêrê safî bête çê kirin. 40 Binêre û li gor mînakên yên ku li çiya ji te re hatine nîşan kirin çêbike!

*Mala Xwedê*
2.Mûs 36,8-38

26 Û tuyê şûnwarê ji deh perdeyî çêbike, tuyê wê ji kitana tenik ya hatiye rîsandin û ji lacîwerd û erxewanî û sorê ve, bi kerûbiyên karê hosta wan çêbike! 2 Dê dirêjiya her perdeyekî bîst û heyşt gez û firehiya her perdeyî çar gez be; dê bona hemû perdeyan pîvan yek be. 3 Pênc perde dê pev re yek bikin[2] û her pênc perdeyên din jî pev re yek bikin. 4 Û tuyê li qeraxa perdeya li serê taximekiye bijkojêyên lacîwerdî çêbike û li qeraxa perda serê taximê din e jî wusa çêbike. 5 Tûyê di perdekê de pêncî bişkojê çêbike û li qeraxa perda taxima din e jî pêncî bişkojê çêbike; dê bişkojê li hember hev û din bin. 6 Û tuyê pêncî hep qumçikên zêrînî çêbike û tuyê bi qumçikan perdeyan bi hev re yek bike û dê şûnwar yek bibe.

7 Û li ser şunwarê mîna çadirekê, ji mûyê bizinan perdeyan çêbike; tuyê wan bi yanzdeh perdeyî çêbike. 8 Dê dirêjiya her perdeyî sîh gez û firehiya her perdeyî çar gez bibe; dê bona yanzdeh perdeyê jî pîvan yek be. 9 Tuyê pênc perde bi cûrekê û şeş perde jî bi cûrekî din yek bike û perda şeşemîn jî li aliyê çadirê ya pêş de qat qatî bike. 10 Û tûyê di perdekê de pêncî bişkojê çêbike û li qeraxa perda taxima din e jî pêncî bişkojê çêbike. 11 Û tuyê ji tûncê ve pêncî heb qûmçik çêbike û wan qumçikan têxe hundirê bişkojêyan û bona

[1] Li rasteka menan binêrin.
[2] Bigihêjin cem hev.
[3] An jî: Yek bike.

ku yek bibe, çadirê bîne cem hev[3].
12 Û nîv perda ku ji ber perdên ça-
dirê ve maye daheliyaye, dê ji paşî
şûnwarê pançîlokî bibe. 13 Û yê
ku ji dirêjiya perdên çadirê zêde
mayî ye, li aliyekî gezek û li ali-
yê din jî gezek, ji wî alî û ji aliyê
din, bona ku şûnwarê buxumînin
dê bi ser wê ve dahêle[1]. 14 Û bona
çadirê, ji eyarên beranan yên bi
boyaxa sor ve hatiye boyax kirin
rûberek û li ser wê jî ji eyarên del-
fînan tuyê rûberekê çêbike.
15 Û bona şûnwarê, tuyê ji
darcêwiyê çarçofeyan çêbike.
16 Dê dirêjiya çarçofeyekê deh
gez û firehiya her çarçofeyê
gez û nîvek bibe. 17 Dê di her
çarçofeyekê de, du cîhê derbas-
bûnê li gor hev hebin; tuyê bona
hemû çarçofeyên şûnwarê wusa
bike. 18 Û tuyê bona şûnwarê
çarçofeyan, bona aliyê başûr, ber
bi başûrê bîst heb çarçove çêbike.
19 Û divê di bin çarçofeyekê de,
bona her du cîhên derbasbûnê du
navko û di bin çarçofeyekê de bona
her du cîhên wê yî derbasbûnê du
navko hebe û di bin bîst çarçofê
de, çel navkoyê zîv 20 û li aliyê
duwemîna şûnwarê, bona aliyê
bakur bîst çarçofe 21 û divê di bin
çarçofeyekê de, du navko û di bin
çarçofeyekê de du navko, tuyê çel
navkoyên wan çêbike. 22 Û tuyê
berbi rojava, bona paşê şûnwarê
şeş heb çarçofe çêbike. 23 Û li
pêy wê bona qozîkên şûnwarê,
tuyê du heb çarçofe çêbike.
24 Û dê li jêr cot bibin û mîna wê,
heta xelika yekem ya ku li jor e dê
bibin cot; dê bona herduyan jî wusa
bibe; ew ê bona her du qozîkan bin.
25 Û heyşt çarçofe û divê di bin
çarçofeyekê de, du navko û di bin
çarçofeyekê de du navko, navkoyên
wanî zîv, şanzdeh navko bibin.
26 Û bona çarçofeyên aliyekî
şûnwarê pênc û bona aliyê dinî
şûnwarê pênc 27 û divê tu ji dar-
cêwiyê, bona çarçofeyên şûnwarê,
yên ku berbi rojavayê ye, pênc heb
sitûn çêbike. 28 Û sitûna navîn ya
di navbera çarçofeyan de ye dê ji
seriyekî, derbasî seriyê din bibe.
29 Û tuyê çarçofeyan bi zêran ve
dagire û bona sitûnan, tevî cîhên
wan, xelikên wan, ji zêr ve çêbike
û tuyê dora sitûnan bi zêr ve da-
gire. 30 Û li gor sazûmana ku li
çiya ji te re hate nîşan kirin; tuyê
şûnwarê ava bike.
31 Û tuyê perdeyekî ji kitana te-
nik, ya ku hatiye badan û lacîwerd
û erxewanî û sor ve çêbike; dê ew
bi kerûbiyên karên hostan bête
çêkirin 32 û tuyê wê li ser çar
sitûnên dorên wan bi zêr ve hatine
girtin; ji darcêwiyê ne û li ser çar
navkoyên zîv sekinîne, daliqîne;
dê çengelên wê zêr bin. 33 Û tuyê
perdê di bin qumçikan de daliqîne

1 Pançîlokî bibe.

û tuyê Sindoqa Şahdeyiyê ji hun-
dirê perdê, bîne wir û ew perde
bona we, dê bibe dîwarê sînor, yê
ku di nava Cîhê Pîroz û Cîhê herî
Pîroz[1] de ye. 34 Û tuyê rûberê ke-
faretê, li Pîrozê herî Pîroz de dey-
ne ser Sindoqa Şahdeyiyê. 35 Û
tuyê sifrê deyne derveyî perdê û
şimadankê deyne hemberê sifrê;
li başûrê şûnwarê deyne û sifrê jî
deyne aliyê bakur.
36 Û tuyê, bona deriyê çadirê,
perdeyekî ji kitana tenik, karê
neqqaşan û di rengên lacîwerd û
erxewanî û sor de çêbike. 37 Û
bona perdê tuyê ji darcêwiyê pênc
heb sitûn çêbike û wan bi zêran ve
bigire[2]; dê çengelên wan zêr bin û
bona wan tuyê ji tuncê, pênc heb
navko birijîne[3].

*Pêşkêşgeha Pêşkêşiya Şewitandinê*
2.Mûs 38,1-7

27 Û tuyê selexanê, ji darcêwi-
yê û wekî dirêjiya wê pênc
gez û firehiya wê pênc gez bibe çê-
bike; dê selexane çar alî yek be û
bilindahiya wê dê sê gez bibe. 2 Û
tuyê qiloçên wê li ser her çar aliyên
wê çêbike û dê qiloçên wê, ji wê
bin û tuyê wê bi tûncê ve bixemilî-
ne. 3 Û feraxên wê, yên ku xweliyê
rakin û carûdên wê û leganên wê
û çengelên wê yên goşt û qabên
wê yên agir çêbike û tuyê hemû
taximên wê ji tuncê çêbike. 4 Û
bona wê, tuyê ji tuncê, bistek mîna
torê çêbike û li ser bistê; li her çar
aliyên wê, tuyê çar xelekî çêbike.
5 Û tuyê wê ji jêr ve, têxe bin qera-
xa selexanê û dê bist bigihêje heta
nêviyê selexanê. 6 Û tuyê bona
selexanê milan, ji darcêwiyê milan
çêbike. Û wan bi tûncê ve bixe-
milîne. 7 Û dê milên wê, derbasî
xelekan bibe û gava wê bikişînin,
dê mil, li her du aliyê selexanê bin.
8 Tuyê wê ji text û hûndirê wê vala
çêbike; mîna ku li çiyê ji te re hati-
ye nîşan kirin, dê wusa çêbikin.

*Hewşa Xanî*
2.Mûs 38,9-20

9 Û tuyê hewşa şûnwarê çêbi-
ke; bona aliyê wê yî başûr, berbi
başûrê, bona aliyekî hewşê, dê sin-
cokên ji kitana tenikên ku dirêjiyên
wan sed gez in û hatine rêsandin
hebin 10 û bîst dîregên wê û dê bîst
navkoyên wan ên ji tûncê ne hebin;
çengelên dîregan û toqên wan, dê
ji zîvê bin. 11 Û bi vî awayî, bona
aliyê bakur, sincokên ku dirêjiya
wan sed gez in û bîst dîregên wê
û dê bîst navkoyên wê yên ji tûncê
ne hebin û dê çengel û toqên dîre-
gan ji zîvê bin. 12 Û li aliyê rojava,

1 An jî: Kudsûlakdas.
2 An jî: Bixemilîne.
3 Yanê birijîne qalip, an jî: Bike qalip.

bona firehiya hewşê, dê pêncî gez
sincok hebin; dê deh heb dîregên
wê û deh navkoyên wê hebin.
13 Û li aliyê rojhilatê, dê firehiya
hewşê, berbi rojhilatê pêncî gez be.
14 Bona aliyekî derî, dê panzdeh
gez sincok hebe; dê sê heb dîregên
wê û sê navkoyên wê hebe. 15 Û
bona aliyê derî yên din panzdeh
gez sincok hebe; dê sê dîregên
wan û sê navkoyên wan hebe.
16 Û bona deriyê hewşê, perde-
yek ji kitana tenik hatiye rêsandin,
karê neqqaşan û di rengên lacîwerd
û erxewanî û sor û di dirêjiya bîst
gezî de hebe; dê çar heb dîregên
wê û çar navkoyên wê hebe. 17 Dê
hemû sitûnên li dora hewşê ne, bi
toqên zîv ve bên toq kirin; dê çen-
gelên wan ji zîvê û navkoyên wan ji
tûncê be. 18 Dê dirêjiya hewşê sed
gez û firehiya wê, ji her derî pêncî
gez û bilindahiya wê pênc gez be û
dê ji kitana tenik ya hatiye rêsan-
din û navkoyên wê ji tûncê bin.
19 Dê hemû taximên şûnwarê, yên
ku di her xizmetê de tên şuxulandin
û hemû singên wê û hemû singên
hewşê ji tûncê bin.

*Ronahiya di Hizûra Xwedê de vêdikeve*

3.Mûs 24,2-4

20 Û tu, bona ku qendîl her tim vê-
keve, tuyê ji lawên Îsraêl re emir
bike ku bila rûnê zeyta xalis yên
zeytûnên ku bona ronahiyê hatine
perçiqandin bînin. 21 Di Çadira Ci-
vandinê de, li derveyî perda ku li ber
şehadetê ye, Harûn û lawên xwe, di
hizûra XUDAN de, ji êvarê heta
sibê, dê wê amade bikin; dê ev bona
lawên Îsraêl, di tûmiya nifşeyên
wan de bibe zagonek her timî.

*Kincên Kahîn*

3.Mûs 8,1-13

28 Û tu, bona ku di nav lawên
Îsraêl de kahîntiyê ji min
re bikin, birayê xwe Harûn û tevî
wî lawên wî, Harûn û lawên wî
Nadab û Abîhû, Eleâzar û Îtamar
bîne cem xwe. 2 Û tuyê ji birayê
xwe Harûn re, bona mezinî û
xişrê kincekî pîroz çêbike. 3 Û tu,
hemûya dilê ku bi ruhê zanînê ve
dagirtime, ji zaniyaran re bibêje,
bila kincê Harûn ji bo wî pîroz
bikin çêkin ku ew kahîntiyê ji min
re bike. 4 Û kincên ku dê çêbikin
ev in: Ber sîng û efodê û fîstan û
qutikê hatiye neqişandin û kofî û
şûtik[1] û bona ku kahîntiyê ji min
re bikin, dê ji birayê te Harûn û ji
lawên wî re kincên pîroz çêbikin.
5 Û dê ji zêr û lacîwerdê û erxe-
waniyê û sorê û kitana tenik bis-
tînin.

*Efod*

2.Mûs 39,2-7

6 Û dê efodê ji zêr û lacîwerd û er-
xewanî û kitana tenik ya hatiye rê-

1 Piştik.

sandin, wekî karê hostayan çêbikin.
7 Bona ku hevbend bikin, dê li her
du seriyên wê, du heb serpîgehên
pevgirêdayî hebin. 8 Û şerîda bi
huner hatiye caw kirin, ya ku li
ser e û bi wê tê girêdan, dê mîna
karê wê û ji wê yî ji zêr û lacîwerd
û erxewanî û kitana tenik ya hatiye
rêsandin be. 9 Û tuyê du heb kevirê
heqîqê rahêje û navê lawên Îsraêl;
10 li gor bûyîna wan, navê şeş kesî
li ser kevirekî û navê şeş kesên din
jî li ser kevirê din bikole. 11 Wan
her du keviran li gor navê lawên
Îsraêl, bi karê vekolînger; mîna
kolana mohrê bikole û tuyê wan
têxe nav cîhên zêrînî. 12 Û wan her
du keviran, bona lawên Îsraêl, bi
kevirên bîranînbûnê deyne ser ser-
pîgehên efodê û bona bîranînê, dê
Harûn navên wan li ber XUDAN,
li ser her du milên xwe bikişîne.
13 Û tuyê cîhên zêr û ji zêra safî du
zincîrî çêbike; 14 tuyê wan mîna
qordonên ku karê hevrêsandinê ne
çêbike û zincîrên hevrêsandî deyne
ser cîhan[1].

*Bersînggeh*

2.Mûs 39,8-21

15 Û tuyê bersînggehek darazi-
yê ya karê hosta çêbike; tuyê wê
mîna karê efodê çêbike; ji zêr, ji
lacîwerd û erxewanî û sor û kita-
na tenik ya hatiye rêsandin çêbike.
16 Dê çar alî yek û du qatî, dirêjiya
wê bihostek[2] û firehiya wê bihostek
bibe. 17 Û tuyê cîhên keviran û çar
rêz keviran têxe hundirê wê; rêzek
heqîqa sor, yaqûta zer û zumrûd,
rêza yekem 18 û rêza duwemîn,
yaqûta gewez, yaqûta şîn û heqîqa
sipî 19 û rêza sêwemîn, yaqûta
ezmanî[3], kevirê silêmanî û yaqûta
mor 20 û rêza çaremîn, zumrûda
ezmanî û heqîq û gehwera hêşîn
be; dê ew li cîhên zêrînî bên bicîh
kirin. 21 Û dê ev kevirana li gor
navê lawên Îsraêl, li gor navên
wan donzdeh heb bin; bona donz-
deh nîjadî, li gor navê her yekî, dê
mîna kolana mohrekê bibin. 22 Û
li ser bersînggehê[4]; mîna qordonên
karê hevrêsandinê, tuyê ji zêrê
safî zincîran çêbike. 23 Û tuyê li
ser bersînggehê du xelekên zêrînî
çêbike, tuyê her du xelekan dey-
ne her du aliyên bersînggehê. 24
Û tuyê du zincîrên hevrêsayî yên
zêrînî têxe serên bersînggehê, têxe
her du xelikan. 25 Û serên din ên
her du zincîrên hevrêsayî, têxe ser
her du cîhan û sermilgehên wê, yên
ku li ber efodê ne. 26 Û tuyê du
xelikên zêrînî çêbike û wan deyne
her du serên bersînggehê ve; aliyê
wê yî hundir yê ku berbi efodê ye.
27 Û tuyê du xelikên zêrînî çêbike

1 An jî: Li ser cîhên zêr dayne.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Keska ezmanî.
4 Berdilkê.

û wan ber efodê, ji binî ve li ser
her du sermilgehê, nêzîkî cîhê ku
efod digihêje wan, deyne ser şerîda
wê ya ku bihuner hatiye rêsandin.
28 Û bila li ser şerîda efodê ya ku
bihuner hatiye rêsandin be û bona
ku, bila bersînggeh ji efodê neqete,
dê bersînggehê bi xelekên xwe bi
qordona lacîwerd, bi xelekên efo-
dê ve girê bide. 29 Û dema Harûn
têkeve cîhê pîroz, li ber XUDAN,
bi bîranîna her timîbûnê, dê navê
lawên Îsraêl di berdilka daraziyê
de li ser dilê xwe bikşîne[1]. 30 Û
tuyê Ûrîm û Tûmmîmê, têxe hun-
dirê bersînggeha daraziyê û gava
hate ber XUDAN, dê li ser dilê
Harûn bin û Harûn dê li ber XU-
DAN daraziya lawên Îsraêl her
tim li ser dilê xwe bigerîne.

*Kincên Kahînên din*

2.Mûs 39,22-26

31 Û tuyê fîstanê efodê bitûmî ji
lacîwerdê çêbike. 32 Û di nava
wê de bona serî dê qulikek hebe;
bona ku neçire dê li dora wê mîna
qula zirxê, dorbergehek karê rê-
sayî hebe. 33 Û li ser dawên wê, ji
lacîwerd û erxewanî û sorê, li dora
dawên wê hinaran û li dora wê, ji
nava wan re zengilkên zêrînî çê-
bike; 34 dê zengilek zêrînî û hina-
rek û zengilek zêrînî, li ser fîstan,
li dora dawa wê bin. 35 Û dê bona
peristinê li ser Harûn be û dema
bikeve cîhê pîroz û derkeve, hi-
zûra XUDAN, bona ku nemire,
dê dengê wî bête bihîstin.
36 Û tuyê ji zêra safî lewheyekê
çêbike û li ser wê bi kolîna mohrê,
tuyê nivîsa: Ji XUDAN re Pîroz
e! lê bikole. 37 Û tuyê wê deyne
ser şerîdekî lacîwerd û dê li ser
pêşiya kofiyê be. 38 Û dê li ser
eniya Harûn be û di xelatên pîroz
yên ku lawên Îsraêl wê pîroz kiri-
ne de, di hemû tiştên pîroz de, dê
sûc yê Harûn be û bona ku ew li
ber XUDAN meqbûl bin, dê her
tim li ser eniya wî be. 39 Û tuyê
ji kitana tenik qutikekî bi setrenc
bide rêsîn û ji kitana tenik, jê re
kofiyê çêbike û ji karê neqqaşan,
şûtikê jê re çêbike.
40 Û tuyê bona lawên Harûn, quti-
kan çêbike û bona wan şûtikan
çêbike û bona wan, bi mezinahî
û xişrê serpûşan çêbike. 41 Û
tuyê hemûyên vana, li birayê xwe
Harûn û tevî wî li lawên wî bike û
bona ku kahîntiyê ji min re bikin,
tuyê wan mesh bike û wan tirxan
bike û wan pîroz bike. 42 Û bona
nuxumandina tazîtiya bedenên
wan tuyê ji wan re derpiyan ji
kitanê çêbike; dê ji piştê heta ke-
maxê bin 43 û gava bikevin Ça-
dira Civandinê, an jî di cîhê pîroz
de, bona peristinê gava hatin cem
selexanê, bona ku sûc bi xwe re
negerînin û nemirin, dê li ser

1 Bigerîne.

Harûn û lawên wî bin; bona wî û
li pêy wî, bona nîjada wî dê bibe
zagona abadîn!

*Bi Kahîntiyê wezîfedar kirin*

3.Mûs 8

29 Bona ku kahîntiyê ji min re
bikin, dema tu wan pîroz
bikî, tiştê ku tuyê ji wan re bike
ev e: Gayek ciwan û du beranên
bêqisûr in 2 û nanê bêhavên û
pîdeyên bêhavên û nanê şikeva
yên bêhavên ên ku rûn di wan
de hatine dayîn bigire; tuyê wan
ji arvanê genima zirav ve çêbike.
3 Û tuyê nan têxe hundirê selikekî
û tuyê wan di selikê de û gayê ci-
wan û her dû beranan bîne. 4 Û
tuyê Harûn û lawên wî bîne deri-
yê Çadira Civandinê û wan bi avê
ve bişo. 5 Û tuyê kincan rahêje û
qutik û fistanê û efodê û sînggehê
li Harûn ke û tuyê şerîda efod ya
ku bi hunerî hatiye rêsandin lê
girê bide 6 û kofiyê deyne serê wî
û tuyê taca pîroz deyne ser kofiyê.
7 Wê gavê tuyê rûnê meshê rahêje
û bi ser serê wî ve dake û wî mesh
bike. 8 Û tuyê lawên wî bîne û
qutikan li wan bike. 9 Û li wan, li
Harûn û lawên wî şûtikan li piştê
wan bike û tuyê serpûşan li wan
girê bide û dê kahîntî, bi zagonek
abadîn bibe ya wan û tuyê Harûn
û lawên wî tirxan bike.
10 Û tuyê ganêrê ciwan bîne ber
Çadira Civandinê û dê Harûn
û lawên wî, destên xwe deynin
ser serê ganêrê ciwan. 11 Û tuyê
ganêrê ciwan li ber XUDAN, di
deriyê Çadira Civandinê de serjê
bike. 12 Û tuyê ji xwîna ganêrê
ciwan rahêje û bi tilîkên xwe, li
ser qiloçên selexanê de bide û
tuyê hemûya xwînê birijîne bin
selexanê. 13 Û hemû bezê ku
hundirê wê girtiye û pergiyê û her
du gurçikan û bezê li ser wan e
bigire[1] û wan di ser agirê selexanê
de bişewitîne. 14 Lê belê divê tu
goşt û eyar û zibilê ganêrê ciwan
li derveyî artêşgehê, di agir de
bişewitîne: Ev qurbana sûcê[2] ye.
15 Û tuyê beranekî rahêje û dê
Harûn û lawên wî, destên xwe dey-
nin ser serê beran. 16 Û tuyê beran
serjê bike û xwîna wî rahêje û li
dorûbera selexanê bike. 17 Û beran
li gor pariyên wî par bike û tuyê hun-
dirê wî û pê wî bişo û wan tevî parî
û serên wî deyne. 18 Û tuyê hemû
beran li ser selexanê bişewitîne; ev
pêşkêşiya ku ji XUDAN re hatiye
şewitandine ye; bêhna xweş e, ev
pêşkêşiya ku bi agir ve ji XUDAN
re hatiye kirin e.
19 Û tuyê beranê din rahêje û dê
Harûn û lawên wî, destên xwe
deynin ser serê beran. 20 Û tuyê
beran serjê bike û ji xwîna wî

1 Biqeşêre.

2 Sûc, an jî: Guneh.

rahêje û di memikê guhê Harûn
yê rast û memikên guhên lawên
wî û li ser tilîkên wan ê pêşîn yên
destên rast û li ser tilîkên wan ê
pêşîn yên lingên rast de bide û
xwînê li dorûbera selexanê ve
bireşîne. 21 Û tuyê ji xwîna ku li
ser selexanêyî û ji rûnê meshê ve
bigire û li ser Harûn û kincên wî û
tevî wî, li ser lawên wî û li ser kin-
cên lawên wî ve bireşîne û ew û
kincê wî û tevî wî lawên wî û kin-
cên lawên wî bên pîroz kirin. 22 Û
ji beran bez û duvê bi bez û bezê
ku hundirê wî girtiye û çermikê
kezebreşê û her du gurçik û bezê
ku li ser wan e û hêta wî ya rastê,
ji ber ku beranê dema ku kesekî
wezîfedar dikin, tê serjêkirinê
ye[1]! 23 Û ji selika bêhavênan, ya
ku li ber XUDAN e nanekî somî
û pîdeyek bi rûn û nanekî şikeva
rahêje 24 û tuyê giştikî deyne ser
lepê Harûn û ser lepên lawên wî û
wan li ber XUDAN, bi pêşkêşiya
lerizandinê bilerizîne. 25 Û tuyê
wan ji destên wan rahêle û di ser
pêşkêşiya ku li ser selexanê de
dişewite, bona XUDAN, bi bêhna
xweş bişewitîne; ev pêşkêşiya ku
bi agir ve ji XUDAN re tê pêşkêşî
kirin e.
26 Û tuyê parxana beranê Harûn
ya tirxanî rahêje û wê li ber XU-
DAN, wekî pêşkêşiya lerizandinê
be, bilerizîne û dê ew bibe para
te. 27 Û ji beranê tirxanê ya bona
Harûn e û lawên wî ye, parxanê
ku pêşkêşiya lerizandinê ye û tête
lerizandin û hêta rakirinê ya ku
hatiye rakirin pîroz bike. 28 Û
bona Harûn û bona lawên wî, dê ji
aliyê lawên Îsraêl ve abadîn bibin
par; ji ber ku pêşkêşiya rakirinê ye
û ji lawên Îsraêl ve pêşkêşiyên se-
lametê, pêşkêşiya ji ber qurbanên
wan ve rakirin, dê bibe pêşkêşiya
ji XUDAN re rakirin.
29 Û kincên pîroz yên Harûn, paşî
wî dê bibin yên lawên wî. Gava
ku bên mesh û tirxan kirin, dê
wan li xwe bikin. 30 Ji lawên wî,
yê ku dêvila wî bibe kahîn, dema
bona ku di cîhê pîroz de peristinê
bike, bikeve Çadira Civandinê, dê
heft rojî wan li xwe bike.
31 Û tuyê beranê tirxanê rahêje û
goştê wî li cîhekî pîroz bikelîne.
32 Û Harûn û lawên wî, dê goştê
beran û nanê ku di selikê de ye,
li ber deriyê Çadira Civandinê
bixwin. 33 Û bona ku xwe pîroz
û tirxan bikin, dê bi wan re, van
xwarinên ku hatine kefaret kirin
bixwin; lê belê divê biyanek ji wan
nexwe, ji ber ku ew pîroz e! 34 Û
ger heta sibehê ji ber goştê tirxanê
û ji nan bimîne, wê gavê tuyê ê ji
ber mayî di agir de bişewitîne; dê
neyê xwarin ji ber ku pîroz e.
35 Û Harûn û lawên wî, li gor
her tiştên ku ji te re emir kirime

1 Beranê pîroziyê ye, an jî: Beranê nezirkirinê ye.

wusa bikin; tuyê heft rojî ji wan
re tirxan bike. 36 Û her roj bona
kefaretê, ganêrê ciwan ê ku qur-
banê sûcê yî pêşkêş bike û gava te
ji bo selexanê kefaretê kir, tuyê wî
paqij bike û bona ku wî pîroz bikî,
tuyê wî mesh bike. 37 Tuyê heft
roj bona selexanê kefaretê bike
û wê pîroz bike û dê selexane bi
zêdeyî pîroz bibe; her tiştê ku bi
selexanê keve, dê pîroz bibe.

*Pêşkêşiyên Rojane*

4.Mûs 28,3-8

38 Û tiştê ku tuyê li ser selexanê
pêşkêş bike ev e: Her tim, her roj,
du berxikên yek salî ne. 39 Tuyê
berxikekê sibehê pêşkêş bike û
berxika din ber êvarê pêşkêş bike
40 û tevî berxikekê, tuyê ji dehî
yek efa[1] yê arvanê zirav ya ku bi
ji çarî yek hîn[2] zeyta zeytûnê ku
hatiye eciqandin, hatiye sitiran-
din û bona pêşkêşiya rijandinê, ji
çarî yek xemrê pêşkêş bike. 41 Û
tuyê berxika din, ber êvarî pêşkêş
bike, bêhna xweş, bi pêşkêşiya
ku bi agirê ve ji XUDAN re ha-
tiye pêşkêşî kirin bûnê ji wî re,
tuyê mîna pêşkêşiya nanê sibehê
û mîna pêşkêşiya ku tê rijandin
bike. 42 Di tûmiya nifşeyên we
de di deriyê Çadira Civandinê de,
li ber XUDAN, dê pêşkêşiya ku
her tim tête şewitandin bibe; bona
ku li wir ji te re bibêjim, li wir ez
ê bêm cem we. 43 Û li wir, ez ê
werim cem lawên Îsraêl û dê Ça-
dir bi mezinahiya min bête pîroz
kirin. 44 Û ez ê Çadira Civandinê
û selexanê pîroz bikim û Harûn
û lawên wî, bona ku kahîntiyê ji
min re bikin, pîroz bikim. 45 Û ez
ê di nav lawên Îsraêl de rûnim û
ji wan re bibim Xwedê. 46 Û dê
bizanibin, bona ku di nav wan de
rûnim, XUDAN Xwedayê wan,
yê ku wan ji welatê Misirê ve der-
xistine ez im; XUDAN Xwedayê
wan ez im.

*Pêşkêşîgeha Buxurê*

2.Mûs 37,25-28

30 Û tuyê bona ku buxurê li
ser bişewitîne, selexane-
yekê ava bike; tuyê wê ji dar-
cêwiyê ve çêbike. 2 Dê dirêjiya
wê gezek û firehiya wê gezek,
çar hawirdor yek bibe; dê bilin-
dahiya wê du gez û qiloçên wê,
ji wê bin. 3 Û tuyê wê, ser wê û
hawirdor aliyên wê û qiloçên wê
bi zêrê safî ve bigire û tuyê per-
waza zêrînî li dora wê çêbike.
4 Û di bin perwazê de, tuyê du
xelekên zêrînî jê re çêbike, tuyê
wan li du alî de di du aliyên wê de
çêbike û bona ku bi piyan ve bête
kişandin, dê ji wan re cîh hebin.
5 Û tuyê piyan ji darcêwiyê çêbike

[1] Ji dehî yek efa, nêzîka 1.3 kg.

[2] Lîtirek û nîv.

û dora wan bi zêr ve dagire. 6 Û
tuyê wê deyne ber perda ku li cem
Sindoqa Şahdeyiyê yî, ber rûberê
kefaretê ya ku li ser şahdeyiyê yî,
deyne ber ew cîhê ku ez ê te li
wir bibînim. 7 Û dê Harûn li ser
wê buxura bêhn xweş bişewitîne;
gava her sibeh qendîlan serrast
bike, dê wê bişewitîne. 8 Û gava
Harûn, ber evarê qendîlan vêxe, li
ber XUDAN, ji nifşeyên we her
tim, bi buxurî dê wê bişewitîne.
9 Li ser wê hûn ê buxura biyan,
an jî pêşkêşiya ku tê şewitandin,
an jî pêşkêşiya nan pêşkêş nekin
û hûn ê pêşkêşiya rijandinê li ser
wê nerijînin. 10 Û dê Harûn, li ser
qiloçên wê salê carekê kefaretê
bike; di salê carekê de kefareta bi
qurbanê sûcê tête kirin, dê di tû-
miya nifşeyên we de bête kefaret
kirin; ev bona XUDAN bi zêdeyî
pîroz e.

*Berdêla Bexşandinê*

2.Mûs 38,25-28

11 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û jê
re got: 12 Dema tu li gor hejmara
lawên Îsraêl, jimartina wan bike,
dê her yek bona canê xwe fîdyê
bide XUDAN; da ku, dema tu wan
bijmêre, bila di navbera wan de
bela nebe. 13 Heçiyên ku derbasî
aliyê jimartinan bibin, bila vêya li
gor şekelê cîhê pîroz, nîv şekelî[1],
(şekelek bîst gera ye), ji XUDAN
re pêşkêşî kirinê nîv şekelî bidin.
14 Her zilamê ku bîst salî an jî jê
mezintir e û derbasî aliyê kesên ji-
martî dibe, dê pêşkêşiya XUDAN
bide. 15 Dema ku hûn bona kefa-
retê ji canê we re bike, pêşkêşiya
XUDAN didin, dê dewlemend ji
nîv şekelî zêdetir nede û yê xizan
jî ji wê kêmtir nede. 16 Û tuyê ji
lawên Îsraêl perê kefaretê bistîne
û bide xizmeta Çadira Civandinê
û ev bona ku ji canên we re bête
kefaret kirin, dê ji bo lawên Îsraêl
li ber XUDAN bibe bîranîn.

*Qazanê xweşuştinê*

2.Mûs 38,8; 40,30-32

17 Û XUDAN ji Mûsa re axifî û
got: 18 Tuyê bona şuştinê qazanek
tûnc û lingên wê jî ji tûncê çêbike.
Û tuyê wê deyne nav bera Çadira
Civandinê û selexanê û avê dagre
hundirê wê. 19 Û dê Harûn û lawên
xwe, lingên xwe ji wê[2] bişon;
20 dema bikevin Çadira Civan-
dinê, an jî dema ji bo pêşkêşiya ku
bi şewitandinê ji XUDAN re tê ki-
rin vêxin, peristinê bikin û nêzîkî
selexanê bibin, ji bo ku nemirin,
dê bi avê ve bên şuştin. 21 Û bona
ku nemirin, dê dest û lingên xwe
bişon û dê ev bona wan, ji wî re û
ji nîjada wî re, di tûmiya nifşeyan
de bibe zagona abadîn.

1 Li rasteka menan binêrin.

2 An jî: Lingên xwe di wê de bişon.

*Rûnê Meshê*

2.Mûs 37,29; 40,9-16

22 Û XUDAN ji Mûsa re axi-
fî û got: 23 Û tuyê jî li gor xwe,
serekê, biharata bi bêhn, pênc
sed şekel, mura rohn û nîvê wê,
du sed û pêncî şekel darçîna
bêhnxweş û du sed û pêncî şekel
qamîşa bêhnxweş 24 û li gor
şekela cîhê pîroz, pênc sed şekel
xiyarşenber û hînek zeytê rahêje
25 û tuyê wan, mîna karê ettaran
ku hatiye rêz kirinê bike rûnê
meshê yê bêhnxweş û pîroz; dê
bibe rûnê meshê yê pîroz. 26 Û
tuyê Çadira Civandinê û Sindoqa
Şahdeyiyê û sifrê û hemû taximên
wê 27 û şimadankê û taximên wê
û selexana buxurê 28 û selexana
pêşkêşiyên şewitandinê û hemû
taximên wê û qazanê û lingê wê,
bi vî rûnê mesh bike. 29 Û tuyê
wan pîroz bike û dê bi zêdeyiyê
pîroz bibin; her tiştê ku bi wan
bibe dê pîroz bibe. 30 Û bona
ku kahîntiyê ji min re bikin, tuyê
Harûn û lawên wî mesh bike û
wan pîroz bike. 31 Û tuyê ji lawên
Îsraêl re biaxife û bibêje: Dê ev di
tûmiya nifşeyan de ji min re bibe
rûnê pîroz yê meshê. 32 Dê li ser
bedena mirovan neyê rijandin û li
gor rêz kirina wê, hûn ê mîna wê
çênekin; ew pîroz e û dê bona we
pîroz be. 33 Yê ku mîna wê rêz
bike, an jî zilamê ku ji yê biyan
deyne ser wê, dê ji netewa xwe ve
bête avêtin!
34 Û XUDAN ji Mûsa re got: Ji
xwe re biharata bêhn xweş, gunu-
ka reş û ezfara bêhn xweş û me-
zeloqa kasnê û biharata bêhnxweş
û gunuka safî rahêje; dê pîvana[1]
wan yek bin; 35 ji wan buxur,
mîna ku karê ettaran be hatiye
xwêy kirin, bêhna xweş ya paqij
û pîroz çêbike 36 û tuyê pariyekî
ji wê zehf zirav bukute û di Çadi-
ra Civandinê de û tuyê deyne ber
şehadeta ku li wir ez ê werim cem
te; dê ji we re bi zêdeyiyê pîroz
be. 37 Û li gor rêzkirina buxura
ku tuyê çêbike, hûn ê ji xwe re
buxurê çênekin; bona te dê ji XU-
DAN re pîroz be. 38 Ji bo bêhnki-
rinê, her kî mîna wê çêbike, dê ji
netewa xwe ve bête avêtin!

*Betsalel û Oholîab*

2.Mûs 35,30-36,3

31 Û XUDAN ji Mûsa re axi-
fî û got: 2 Binêre, min bi
navê wî bangî Betsalelê lawê Ûri-
yê lawê Hûr ê ku ji eşîra Cihûda
ye, kir 3 û wî di zaniyariyê de û
di fêhmkariyê de û di zanînê de û
di her cûreyên hunerê de bi Ruhê
Xwedê ve dagirt; 4 da ku, bila
karên bihuner bifikire; di zêr û zîv
û tuncê de buşuxulîne 5 û di qe-
wartina kevirên ku dê bên kutan-
din de, qewartina daran û di her

---

1 An jî: Bila giraniya wan yek be.

cûre hunerê de buşuxulîne. 6 Û a
vay, min Oholîabê lawê Ahîsamak
yê ku ji eşîra Danê ye danî cem wî
û zanînê xistim hemûyên ku dilên
wan bi zaniyar in, da ku, her tiştên
ku ji te re emir kirime, 7 Çadira
Civandinê û Sindoqa şahdeyiyê
û rûberê kefaretê ya ku li ser wê
yî û hemû taximên çadirê 8 û sif-
rê û taximên wê û şimadanka ku
zêra safî ye û hemû taximên wê
û selexana buxurê 9 û selexana
pêşkêşiya şewitandinê û hemû ta-
ximên wê û qazanê û lingê wê 10 û
bona ku kahîntiyê bikin, kincê ku
zirav hatiye rêsandin û kincê pîroz
yê Harûnê kahîn û kincên lawên
wî 11 û rûnê meshê û bona cîhê
pîroz bila buxura biharatên bêhn
xweş çêbikin; tam mîna ku ji te re
emir kirime, çêbike.

*Sebt: Roja Vêsandinê ye*

2.Mûs 20,8-11; 1.Mûs 2,1-3

12 Û XUDAN ji Mûsa re axifî û
got: 13 Tu bi lawên Îsraêl re biaxi-
fe û bêje: Hûn ê bi rastî rojên min
ên Sebtê bigirin; ji ber ku ew di nav
we û min de di tûmiya nifşeyên we
de nîşanek e, da ku, hûn bizanibin
XUDANê we pîroz kiriye ez im.
14 Bo vê yekê, hûn ê bi Sebtê bi-
girin; ji ber ku ji we re pîroz e; yê
ku wê xera bike, dê muheqeq bête
kuştin; di wê rojê de her kî ku kar
bike, dê ew can ji netewa xwe ve
bête avêtin! 15 Şeş roj kar tê kirin,
lê belê di roja heftemîn de, Sebta
rehetiyê ya ku ji XUDAN re pîroz
e yî; her kesên ku di roja Sebtê de
kar bikin, dê bi biryarî bên kuştin!
16 Û di tûmiya nifşeyên xwe de
bona ku Sebtê bikin peymaneke
abadîn, dê lawên Îsraêl bi Seb-
tê bigirin. 17 Ew di nava min û
lawên Îsraêl de nîşanek abadîn e;
ji ber ku XUDAN erd û ezmanan
di şeş rojan de afirandin û di roja
heftemîn de rehet kir û rawestiya.
18 Û dema wî li Çiyayê Sînayê,
bi Mûsa re hevpeyvînê qedand,
du lewhayên şahdeyiyê, lewhê
kevirîn, yên ku bi tilîka Xwedê ve
hatine nivîsandin da wî.

*Golika Zêrinî*

Zeb 106,19-22; K.Şa 7,39-41;
1.Qir 12,25-33

32 Û dema netewê dît ku
Mûsa ji çiyê daketinê de-
reng ma, netewe li cem Harûn
civiya û jê re gotin: Rabe! bona
me îlahek çêbike, bila ji pêşiya
me bimeşe! ji ber ku em nizanin ji
Mûsa re, ji zilamê ku me ji Misirê
derxistine çi bûye. 2 Û Harûn ji
wan re got: Guharên zêrîn, yên ku
di guhên pîrek û law û qîzên we
de ne bişkînin û derxînin û wan
ji min re bînin! 3 Û hemûya nete-
wê guharên zêr, yên ku di guhên
xwe de ne şikestandin û derxistin
û wan ji Harûn re anîn. 4 Û wan
ji destê wan rahişt û bi haletê qe-

wartinê teşe da wan û wan kir
golikek darêjî û gotin: Ya Îsraêl,
îlahê ku te ji welatê Misirê ve der-
xistine ev e! 5 Û Harûn wê dît û
li ber wê selexane çêkir û Harûn
bang kir û got: Sibê ji XUDAN
re cejn e! 6 Û roja din zû rabûn
û pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş
kirin û pêşkêşiyên xweşiyê anîn û
netewe bona xwarin û vexwarinê
rûniştin û bona ku bilîzin rabûn.

*Hêrsa Xwedê û lavakirina Mûsa*
5.Mûs 9,12-29; Zeb 106,23

7 Û XUDAN ji Mûsa re got: Here,
dakeve jêr! Ji ber, netewa ku te ji
welatê Misirê ve derxistiye xera
bû; 8 ji rêya ku min ji wan re emir
kiribû, zû şaş bûn; bona xwe go-
likek darêjî çêkirin û ji wî re sec-
de kirin û jê re qurbanê serjêkirin
û gotin: Ya Îsraêl, îlahê ku te ji
welatê Misirê ve derxistiye ev e!
9 Û XUDAN ji Mûsa re got: Vê
qewmê dîtim û a vay, neteweyek
stûkur hişk e 10 û a vay, min berde,
bila li dijî wan hêrsa min sor bibe û
ez wan tune bikim û ez ê te bikim
neteweyek mezin! 11 Û Mûsa li
ber Xwedayê xwe XUDAN geriya
û got: Ya XUDAN, ma çima hêr-
sa te li dijî netewa te, ya ku te bi
hêzek mezin û bi destekî biqudret
ji welatê Misirê ve derxistiye sor
dibe? 12 Ma çima Misirî bibêjin:
Bona ku xerabiyê bi wan bike,
bona ku li çiya bikuje û bona ku
li rûyê erdê tune bike, wî wan der-
xist? Ji hêrsa xwe ya sor vegere û
li dijî netewa xwe ji vê xerabiyê
ve poşman be! 13 Qûlên xwe Bi-
rahîm, Îshaq û Îsraêl di bîra xwe de
bîne, te ji wan re li ser xwe sondê
da û ji wan re got: Ez ê nîjadên we
qasî sitêrkên ezmanan zêde bikim
û hemûya ev welatê ku di derheqê
wê de gotime, ez ê bidim nîjada
we û dê wê abadîn bi mêrasî bigi-
rin! 14 Û XUDAN, ji xerabiya ku
gotibû ez ê ji netewa xwe re bikim
poşman bû.
15 Û Mûsa vegeriya û tevî her
du lewhên şahdeyiyê, yên ku di
destê wî de ne ji çiyê daket; her
du aliyê[1] lewhayan bi nivîs bû;
rûyek wê û rûyê wê yî din bi ni-
vîs bû. 16 Û ew lewhana karên
Xwedê bûn û li ser lewhayan ni-
vîsa qewartî, nivîsa Xwedê bû.
17 Û gava qêriyan, Yêşû dengê
netewê bihîst û ji Mûsa re got: Di
artêşgehê de dengê cengê heye!
18 Û wî got: Ne dengê serketi-
yan e, ne jî dengê binketiyan e,
lê ez dengê kesên ku distirên di-
bihîzim! 19 Û wusa bû ku, dema
nêzîkî artêşgehê bûn, golikê û
lîstikên wan dîtin û hêrsa Mûsa
sor bû û lewhayan ji destên xwe
avêt û li pala çiyê wan şikand.
20 Û golikê ku çêkiribûn rahişt
û di agir de şewitand û heta ku

1 Rûyê lewhayan.

bibe toz, eciqand û li rûyê avê ve
reşand û bi lawên Îsraêl ve da ve-
xwarin.
21 Û Mûsa ji Harûn re got: Ma
ev netewa çi bi te kiribûn ku te
sûcekî ewqasî mezin anî ser wê?
22 Û Harûn got: Bila hêrsa efendi-
yê min sor nebe! Tu bi netewê di-
zane, ew bona xerabiyê amade ye.
23 Ji ber ku ji min re gotin: Bona
me îlahek ku ji pêşiya me bimeşe
çêbike; ji ber ku em nizanin ji
Mûsa re, ji zilamê ku me ji Misirê
derxistine re çi bûye! 24 Û ji wan
re gotim: Her bi kê re zêr hebe,
bila bişkînin û derxînin û dan min
û wê avêtim nav agir û ev golik
derket! 25 Û Mûsa dît ku netewa
wî bêhefsar in; ji ber Harûn, bona
ku wê ji neyarên wê re bike qerfok
bêhefsar hiştibû. 26 Û Mûsa di de-
riyê artêşgehê de sekinî û got: Yê
ku li aliyê XUDAN e, bila werin
cem min! Û hemûyên lawên Lêwî
li cem wî civiyan. 27 Û ji wan re
got: Xwedayê Îsraêlê XUDAN
wusa dibêje: Bila her kes şûrê
xwe bi pişta xwe ve girê bide û di
artêşgehê de derî bi derî bigere û
her kes birayên xwe û her kes he-
valên xwe û her kes bila cîranên
xwe bukuje! 28 Û lawên Lêwî, li
gor gotina Mûsa kirin û ew roj,
qasî sê hezar zilam ji netewê ke-
tin. 29 Û Mûsa got: Bona ku îroj
bereketê bide we, xwe ji XUDAN
re rêz bikin, ji ber ku her kes li dijî
lawê xwe û birayê xwe rabû!
30 Û roja din wusa bû ku, Mûsa
ji netewê re got: We sûcekî mezin
kir; niha ez ê derkevim ber[1] XU-
DAN; dibe ku ez bona sûcên we
kefaretê bikim. 31 Û Mûsa zivirî
XUDAN û got: Ax vê netewa,
sûcekî mezin kir û ji xwe re îlahên
zêrînî çêkir. 32 Û niha, ger tu li
sûcên wan biborîne! û ya na ez ê
rica bikim, navê min ji pirtûka ku
te nivîsandî ye paqij bike[2]! 33 Û
XUDAN ji Mûsa re got: Her kî
ku li dijî min sûc kiribe, ez ê wî
ji pirtûka xwe paqij bikim! 34 Û
niha here, netewê bibe cîhê ku ez
ê ji te re bibêjim; a vay, milyaketê
min dê di pêşiya te de bimeşe; lê
belê di roja ku ez li wan bigerim
de, ez ê li ser wan, li sûcên wan
bigerim!
35 Û XUDAN li netewê xist, ji
ber, golikê ku Harûn çêkiribû; çê-
kirin.

*Amadekariya ji Horebê çûyînê*

33 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Here, tu û netewa ku te ji
welatê Misirê derxistibû, ji vir
derkeve, welatê ku sondê dabûm
ku ez ê bidim Birahîm, Îshaq û

1 Hizûra XUDAN.

2 An jî: Navê min ji pirtûka ku te nivîsandî ye ve derxîne (rake).

Aqûp, nîjada te! 2 û ez ê ji pêşiya
te milyaketekî bişînim welatê
ku şîr û hungiv jê diherike; ez ê
Kenanî û Amorî û Hittî û Perizzî
û Hivî û Yebûsiyan biqewirînim;
3 ji ber ku ez ê di nava te de der-
nekevim, ji ber ku tu neteweyek
stûkur hişkî; dibe ku di rê de ez te
biqelihînim! 4 Û dema netewe vê
agahiya bihîst, şînê girt û tu kes
xemilên xwe bi xwe ve nekir. 5 Û
XUDAN ji Mûsa re got: Ji lawên
Îsraêl re bibêje: Hûn neteweyek
stûkur hişk in! Ger ez deqayekê
di nav te de derkevim, ez ê te tune
bikim û niha xemlên xwe ji ser
xwe rake ku, ez bizanibim ka ez ê
çi ji te re bikim. 6 Û lawên Îsraêl,
ji çiyayê Horebê dest pê kirin û
xemlên xwe ji xwe kirin.

*Mûsa û Rewnaqiya Xudan*

2.Mûs 34,5-9.29

7 Û Mûsa çadirê radihişt û wê li
derveyî artêşgehê, li dûrî arteşgehê
datanî û jê re digot, Çadira Civan-
dinê. Û wusa bû ku, her zilamê ku
li XUDAN digeriya, ji artêşgehê
derdiket û bi Çadira Civandinê
re hildikişiya. 8 Û wusa dibû ku,
dema Mûsa derdiket Çadirê, hemû
netewe radibûn û her kes di deriyê
çadirên xwe de disekinîn û heta ku
Mûsa diket Çadirê li pêy wî dinêri-
yan. 9 Û wusa bû ku, dema Mûsa
diket Çadirê, sitûna ewrê dadiket û
di deriyê Çadirê de disekinî û XU-
DAN bi Mûsa re diaxifiya. 10 Û
hemûya netewê, sitûna ewrê ya ku
di deriyê Çadirê de sekiniye didîtin
û hemûya netewê radibûn û her
kes di deriyê çadirên xwe de sec-
de dikirin. 11 Û XUDAN bi Mûsa
re mîna zilamek bi hevalê xwe re
biaxife, rû bi rû diaxifî. Û Mûsa
vedigeriya artêşgehê; lê belê xiz-
metkarê wî, zilamê ciwan, Yêşûyê
lawê Nûn ji hundirê Çadirê vene-
diqetiya.
12 Û Mûsa ji XUDAN re got: A
vay, tu ji min re: Vê netewê der-
xîne dibêje û te negihand ku tuyê
kî bi min re bişîne. Lê belê te ji
min re got: Ez te bi navê te nas
dikim û te di çavê min de xêrê
dît. 13 Û niha ez rica dikim, ger
di çavê te de xêrê dîtibim, rêyên
xwe ji niha ve ji min re agahî bike,
da ku, bona ez di çavê te de xêrê
bibînim, te binasim û bifikire ku
ev gel netewa te ne! 14 Û got: Dê
wecê min tevî te here û ez ê rehe-
tiyê bidim te. 15 Û jê re got: Ger
dê wecê te bi min re neçe, me ji vê
derê dernexe! 16 Ji ber ku dê niha
bi çi bête zanîn ku ez û netewa te,
me di çavên te de xêrê dîtine? Ma
hatina te yî bi me re, ne cudayiya
min û netewa te, ya ku ji hemû ne-
teweyên li rûyê erdê ne yî?
17 Û XUDAN ji Mûsa re got: Ez ê
ev tiştê ku te gotin jî bikim; ji ber
ku te di çavê min de xêrê dît û ez, te
bi navê te dinasim! 18 Û ew (Mûsa)

got: Ez rica dikim, mezinahiya xwe
rê min bide! 19 Û XUDAN got: Ez
ê hemû qenciya xwe ji ber te derbas
bikim û ez ê navê XUDAN li ber te
bang bikim û ji zilamê ku ez ê xêrê
jê re bikim re, ez ê xêrê bikim û ji
zilamê ku ez ê li ber wî bikevim, ez
ê li ber kevim. 20 Û ew (XUDAN)
got: Tu nikarî wecê min bibînî; ji
ber ku mirov min bibîne, nikare
bijî! 21 Û XUDAN got: A vay, li
cem min cîhek heye û tuyê li ser
zinarê bisekine 22 û dê wusa bibe
ku, dema mezinahiya min derbas
bibe, ez ê te têxim quntarekî zinarê
û heta ku ez derbas bibim, ez ê te
bi destê xwe ve bunuxumînim 23 û
ez ê destê xwe rakim û tuyê ji paş
ve min bibîne; lê belê dê wecê min
neyê dîtin!

*Peyman tête nûkirin*

5.Mûs 10,1-5

34 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Bona xwe, mîna yên berê
du heb lewhayên kevir bibire û ez
ê gotinên li ser lewhên berê yên
ku te şikestandibûn, li ser vana bi-
nivîsînim. 2 Û heta sibehê amade
be û sibehê hilkişe Çiyayê Sînayê
û li ser girê çiyê, li ber min biseki-
ne. 3 Û dê tu kes bi te re hilnekişe
û di tûmiya çiyê de tu kes neyên
dîtin û bila li ber wî çiyayî mîh
an jî dewar neçêrin! 4 Û her du
lewhayên kevirî, mîna yên berê
birrî û Mûsa mîna ku XUDAN
jê re emir kiribû, sibehê zû rabû
û derket Çiyayê Sînayê û her du
lewhên kevirî di destê xwe de bir.
5 Û XUDAN ji ewrê daket û li
wir, bi wî re sekinî û navê XU-
DAN bang kir. 6 Û XUDAN ji
ber wî derbas bû û bang kir: XU-
DAN, XUDAN, Xwedayê ku
zehf keremkar[1] û dilovan e; yê ku
dereng hêrs dibe, qencî û dilova-
niya wî pirr e, 7 yê ku ji hezaran
re qenciyê dike, li neheqî, guneh
û sûcê diborîne û yê bisûc tu carî
bêsûc dernaxe, gunehên bavan di
lawan de û di lawên lawan de û di
nifşeya sêwem û çaremîn de dige-
re yî. 8 Û Mûsa lez kir û bi erdê
ve xwar bû û secdê kir. 9 Û got:
Ger di çavê te de xêrê dîtibim, ya
Xudan ez rica dikim, bila Xudan
tevî me were; ji ber ku ev, nete-
weyek stûkur hişk e û li guneh û
sûcen me biborîne û me ji xwe re
bi mêrasî rahêle!
10 Û wî got: A vay, ez sond di-
xwim; ez ê nuwazeyên ku, li pêşiya
hemû neteweya te, di hemû dinê de
û di hemû gelan de nehatine kirin,
çêbikim û hemû netewa ku tu di
navê de yî, dê karê XUDAN bi-
bînin, ji ber tiştê ku ez bi te re çêdi-
kim, sawêr e. 11 Bi ev tiştê ku îro ji
te re emir kirime bigire, a vay, ez ê
Amorî û Kenanî û Hittî û Perizzî û
Hîvî û Yebûsiyan ji ber te biqewirî-

[1] Lutifkar, qencîker, an ji: Xêrxwaz.

nim. 12 Bi kesên, li welatê ku tu diçeyê rûdinin ve peyman danînê[1] xwe bide alî, da ku, bila di nava we de dafik tune be; 13 lê belê hûn ê selexaneyên wan xera bikin û hûn ê kevirên wanî çikandî perçe bikin û hûn ê Aşerên wan serjê bikin. 14 Ji ber ku tuyê ji îlahekî din re secdê neke; ji ber, XUDANê ku navê wî çavnebar e, Xwedayek çavnebar e; 15 da ku, tu bi yên ku li welêt rûdinin re peymanê danîne û bila nebin tabihê îlahên wan û zinê nekin û qurbanan ji îlahên wan re serjê nekin û yek bila te dawet meke û tu jî ji qurbanê wî nexwe 16 û tu ji law û qîzên wî nestîne û qîzên wan, tabihî îlahên xwe ne û zinê dikin û bila lawên te jî tabihê îlahên xwe nekin û bi wan re zinê nedin kirin. 17 Tuyê bona xwe îlahên rijandî çêneke!

18 Tuyê cejna nanê bêhavên pîroz bike. Mîna ku emir dabûm te, di meha Abîbê de, di dema bijartî de tuyê heft roj nanê bêhavên bixwe; ji ber ku tu di meha Abîbê de ji Misirê ve derket. 19 Hemûyên pêşiyê bûyîne yên min in û ji çêlek û ji mîh, ji hemû heywanên te, nêriyên pêşiyê bûyîne yên min in. 20 Û tuyê bona yê pêşî zayiyê kerê, berxikekê bi fidyeyî bide û ger tu fidyê nedî; wê gavê divê tu stûyê wî bişkîne. Tuyê bona hemû lawên xwe yî pêşiyê bûyîne fidyê bide. Dê tu kes li ber min, destvala xuyanî nebe.
21 Tuyê şeş roj buşuxule û di roja heftemîn de xwe rehet bike; tuyê di dema çandin û çinandinê de rehet bike. 22 Û di dema nûberê şiklê genim de tuyê ji xwe re cejna hefteyan û di dawiya salê de jî cejna berhevkirinê çêbike.
23 Hemûyên zilamên te, di salekê de sê carî li ber Xwedayê Îsraêlê, Xudan, XUDAN ve bên xuyanî bûn. 24 Ji ber ku ez ê neteweyan ji ber te biqewirînim û sînorên te fireh bikim û gava salê sê carî, bona ku tu li ber XUDAN xuyanî bibe hilkişe, dê tu kes nikaribe çav berde welatê te. 25 Divê tu xwîna qurbanê min bi nanê bihavên ve pêşkêş neke û qurbana cejna Fisihê heta sibê nemîne. 26 Pêşiyê nûberê erdên xwe, tuyê bîne mala Xwedayê xwe XUDAN. Tuyê karikê di şîrê diya wê de nekelîne.
27 Û XUDAN ji Mûsa re got: Van gotinan binivîse; ji ber ku min bi van gotinana bi te û Îsraêl re peymanê danî. 28 Û li wê derê, çel roj û çel şev bi XUDAN re ma; nan nexwar û avê venexwar. Û gotinên peymanê, deh emir li ser lewhayan nivîsand.

*Mûsa ji Çiyayê Sînayê dadikeve*
2.Kor 3,7-18

29 Û dema Mûsa ji Çiyayê Sînayê daket, wusa bû ku, her du

1 An jî: Ji sond xwarinê xwe bide alî.

lewhên şahdeyiyê di destê wî
de bûn û Mûsa nizanîbû, ji ber
ku bi XUDAN re axifiye, çermê
wecê wî dibiriqe. 30 Û Harûn û
hemûyên lawên Îsraêl Mûsa dîtin
û a vay, çermê wecê wî dibiriqî
û tirsiyan ku nêzîkî wî bibin.
31 Û Mûsa bangî wan kir û
Harûn û hemû serokên civakê
vegeriyan cem wî û Mûsa ji wan
re got. 32 Û dawiyê hemû lawên
Îsraêl nêzîk bûn û hemû tiştên ku
XUDAN li Çiyayê Sînayê jê re
gotiye, ji wan re emir kir. 33 Û
dema Mûsa bi wan re axaftinê
qedand, pêçikek danî wecê xwe.
34 Lê belê Mûsa, dema bona
axaftinê diket hizûra XUDAN,
heta ku derdiket, pêçikê radikir û
dema derdiket derve tiştê ku jê re
hatiye emir kirin, ji lawên Îsraêl
re digot. 35 Û lawên Îsraêl dîtin
ku wecê Mûsa û çermê wecê
Mûsa dibiriqe û gava Mûsa, heta
bona ku bi XUDAN re biaxife
diket hundir, dîsa pêçekê dida ser
wecê xwe.

*Qaîdeyên Sebtê*

2.Mûs 35-40

35 Û Mûsa hemû civaka lawên
Îsraêl civand û ji wan re got:
Tiştên ku XUDAN, bona kirinê
emir dayiye ev in. 2 Şeş roj kar tê
kirin, lê belê di roja heftemîn de
bona we Sebta pîroz, dê bibe roja
ku ji XUDAN re rawestinê; her
zilamê ku di wê de kar bikin, dê
bên kuştin. 3 Hûn ê di roja Sebtê
de di hemû şunwarên xwe de agir
vênexin!
4 Û Mûsa bi hemû civaka lawên
Îsraêl re axifî û got: Tiştê ku XU-
DAN emir da û got ev e: 5 Di nav
hev de pêşkêşiyê ji XUDAN re
bigirin; her kesên ku dilên wan bi
xwestek in, bila wê pêşkêşiya XU-
DAN, zêr û zîv û tunc 6 û lacîwerd
û erxewanî û sor û kitana tenik û
mûyê bizinan 7 û eyarên beranan
yên bi boyaxa sor[1] û eyarên delfîn-
an û darcêwiyan 8 û bona ronahi-
yê don û bona rûnê meshê û bona
gunuka bêhnxweş biharat 9 û bona
efodê û bona sînggehê kevirên
heqîqê û kevirên ku tê bên kutan-
din bînin.
10 Û bila hemû zilamên bi zani-
yar, ji nav we werin û her tiştên
ku XUDAN emir kiriye çêbikin:
11 Şunwarê, çadira wê û rûberê wê
û qumçikên wê û çarçofeyên wê û
mirdiyaq û sitûn û navkoyên wê;
12 sindoqê û piyên wê, rûbera wê
ya kefaretê û rûberê dabeşandinê;
13 sifrê û piyên wê û hemû taxi-
mên wê û nanê aramiyê 14 û bona
şimadankê û taximên wê û qen-
dîlên wê û bona ronahiyê don 15 û
selexana buxurê û piyên wê û rûnê
meshê û buxura bêhnxweş û di de-
riyê şunwarê de, bona derî perdê;

[1] An jî: Yên ku bi boyaxa sor ve hatine boyax kirin.

16 tevî bista wê yî tûnc, selexana
pêşkêşiyên şewitandinê, piyên
wê û hemû taximên wê, qazanê
û lingên wê; 17 asqiyên hewşê,
dîregên wê û navkoyên wan û
perda deriyê hewşê, 18 singên
şunwarê û singên hewşê û benên
wê; 19 kincê pîroz ê Harûnê kahîn
û bona kahîntiyê bikin, kincên
lawên wî, bona di cîhê pîroz de
peristinê bikin, bila kincên tenik
hatine rêsandin çêbikin.
20 Û hemû civaka lawên Îsraêl,
ji cem Mûsa derketin. 21 Û her
zilamê ku dilê wî, tevgerê dida
wî û her zilamê ku ruhê wî, wî bi
xwestek dike hatin û bona karên
Çadira Civandinê û bona hemû
xizmetên wê û bona kincên pîroz,
pêşkêşiya XUDAN anîn. 22 Û
mêr û jin, hemûyên ku dilên wan
bi xwestek bûn hatin, her yekê ku
ji XUDAN re pêşkêşiya zêr pêşkêş
dikir toq[1] û xelekan û gustîlkan û
bazinan, hemûyên taximan zêr
bûn, anîn. 23 Û her kesê ku li cem
wan lacîwerd û erxewanî û sor û
kitana tenik û mûyê bizinan û eya-
rên beranan yên bi boyaxa sor[2] û
eyarên delfînan hebûn, wan anîn.
24 Her yekê ku pêşkêşiyên zîv
û tûnc pêşkêş kirine, pêşkêşiya
XUDAN anîn û bona her karê
xizmetê, her zilamê ku darcêwî
li cem heye, wê anîn. 25 Û hemû
pîrekên ku dilên wan bi zaniyar
in, wan bi destên xwe rêsandin
û yên ku rêsandibûn û lacîwerd
û erxewanî û sor û kitana tenik
anîn. 26 Û hemû pîrekên ku dilên
wan, wan di hunerê de tevdayine,
mûyê bizin rêsandin. 27 Û sero-
kan, bona efod û bona sînggehê
kevirên heqîqê û kevirên ku dê
bên kutandin 28 û bona ronahî û
bona rûnê meshê û bona gunu-
ka bêhnxweş, biharat û rûn anîn.
29 Bona ku bi destê Mûsa çê-
bikin, bona her yek karên ku XU-
DAN emir kiriye, her mêr û her
jin, lawên Îsraêl, yên ku dilên wan
bona ku bînin wan bi xwestek ki-
rine, ji dil pêşkêşiyan ji XUDAN
re anîn.

*Betsalel û Ohalîab*

2.Mûs 31,1-11

30 Û Mûsa ji lawên Îsraêl re got:
Binêrin, XUDAN bi navê Bet-
saleliyê lawê Ûrî yê lawê Hûrê ji
eşîra Cihûda yî, bangî wî kir 31 û
di zaniyarî, fêhmkarî û zanînê de
32 û bona ku karên xwe yên bihu-
ner bifikire û di zêr û zîv û tûncê
de buşuxulîne 33 û bona ku buku-
te, keviran bibire û di qewartina
daran de û bona ku di her cureyên
hunerê de bi marîfet buşuxulîne, wî
bi Ruhê Xwedê ve dagirt. 34 Û xis-
te dilê wî ku, ew û Oholîabê lawê

1 Sincak, (yanê derzîk û xemlikên berstûyan).

2 An jî: Yên ku bi boyaxa sor ve hatine boyax kirin.

Ahîsamakê ku ji eşîra Dan e, bidin
fêr kirin. 35 Di karê qewartkar û
hosteyan de û di lacîwerdê de, di
erxewanê de, di sorê de û di kitana zirav de, di karê neqqaş û rêsger
de, yên ku di her celebek hunerê de
dixebitin û yên ku karên bi huner
difikirin bûnê, bona ku her cûreyên
hunerê bikin, wan bi zaniyariya dil
ve dagirtin.

*Avakirina Xanî dest pê dike*
2.Mûs 36,1-38,20

36 Û Betsalel û Oholîab û her
zilamê dilê wan bi zanîn,
yên ku XUDAN bona hemû karên
cîhên pîroz çêbikin zaniyariyê
dane wan, dê li gor her tiştên ku
XUDAN emir kiriye bişuxulin.
2 Û Mûsa bangî Betsalel û
Oholîab û her zilamê bi zanîn,
yên ku XUDAN zaniyariyê daye
wan, her zilamê ku bona kar kirinê dilê wî, wî tîne xîretê kir 3 û
bona karê cîhê pîroz, bona ku wê
çêbikin, hemû pêşkêşiya ku lawên
Îsraêl anîne, ji ber Mûsa rahiştin.
Û wan her sibeh, dîsa pêşkêşiyên
ji dil jê re anîn. 4 Û hemûyên
zaniyar, heçiyên ku hemû karên
cîhê pîroz çêdikin, her yek ji karê
ku çêdikir hatin. 5 Û bi Mûsa re
axifîn û gotin: Netewe bona karê
ku XUDAN emrê kirina wê dabû,
ji hewcedariyê zêdetir tînin! 6 Û
Mûsa emir da û li artêşgehê divê
him zilam û him jî pîrek, bona ku
pêşkêşiya cîhê pîroz bila êdî kar
nekin hate bang kirin! Û netewe ji
anînê hatin rawestandin. 7 Ji ber
pertalê ku amade bû, têra hemû
karê ku dê bê kirin dikir û zêdetir
jî dima.
8 Û di nava yên ku kar dikin de,
yên ku dilên wan bi zaniyar in,
şunwarê bi deh perdan çêkir; Betsalel wan ji kerûbiyên karên hosta
yên ku ji kitana tenik ya ku hatiye
badan û bi laciwerd û erxewanî û
sor in, çêkir. 9 Dirêjiya her perdeyî bîst û heyşt gez û firehiya
her perdeyî çar gez bû; pîvanên
hemû perdan yek bûn. 10 Û pênc
heb perde, bi hev re girêdan û her
pênc perdên din jî bi hev re girê
dan. 11 Û li qeraxa perda ku li serê
taximekî ye, qulpikên lacîwerd
çêkir; li qeraxa perda serê taximê
din e jî wusa kir. 12 Li perdeyekê
pêncî heb qulpik çêkir, li qeraxa
perda di taximê din e jî pêncî heb
qulpik çêkir; qulpik li hember hev
bûn. 13 Û pêncî heb qumçikên
zêrînî çêkir û perdeyan bi qumçikan bi hev re girê dan û şunwar
yek bû.
14 Û li ser şunwarê, bona ku bibe
çadir ji mûyê bizinan perdeyan çêkir; perdeyên ku çêkiribûn yanzdeh
heb bûn. 15 Dirêjiya her perdeyek
sîh gez bû û firehiya her perdeyekî
çar gez bû; pîvanên yanzdeh perdeyî yek bûn. 16 Û pênc hep perde
bi cudayî û şeş heb perde jî bi cu-

dayî girê dan. 17 Û li qeraxa perda
ku li herî serê taximekî ye, pêncî
heb qulpik çêkir û li qeraxa perda
herî serê taximê din e, pêncî heb
qulpik çêkir. 18 Û bona ku bibin
çadirek, ji bo girêdana wê pêncî
heb qumçikên tûncî çêkir. 19 Û
bona çadirê ji eyarên beranan, yên
bi boyaxa sor in, rûberek û li ser wê
ji eyarên delfînan rûberek çêkir.
20 Û bona şunwarê, ji darcêwiyê
çarçofeyên ku çik bisekinin çêkir.
21 Dirêjiya çarçofeyekî deh gez û
firehiya her çarçofê gezek û nîv
bû. 22 Du milên çarçofeyan he-
bûn û ew pev re hatibûn hevbend
kirin; hemû çarçofeyên şunwarê
wusa çêkir. 23 Û bona şunwarê
çarçofeyan berbi başûrê, bona
aliyê başûr bîst heb çarçofe çêkir
24 û bona di bin çarçofeyekê de
bona her du piyên wê du navko
û di bin çarçofa din de bona her
du piyên wê du navko hebin, di
bin bîst çarçofeyê de çel heb nav-
koyên zîvî çêkir. 25 Û bona ali-
yê duwemîn ya şunwarê li aliyê
bakur bîst heb çarçofe 26 û bona
binê çarçoveyekê du heb navko û
di binê çarçofeya din de jî du nav-
ko bûnê, çel heb navkoyên wanî
zîvî çêkir. 27 Û berbi rojava, bona
paşê şunwarê şeş heb çarçofe çê-
kir. 28 Û li aliyê wê yî paşê, bona
quncikên şunwarê du heb çarçofe
çêkir. 29 Û ew, li jêr cot bû; mîna
wê heta jora wê, xelika yekemîn
cot bû; li her du qozîkên wê de,
wan herduyan jî wusa kirin.
30 Û heyşt çarçofe û bona di bin
her çarçofeyan de du heb navko
hebin, şanzdeh heb navkoyên
wanî zîv hebû.
31 Û bona çarçofeyên aliyekî
şunwarê, ji darcêwiyê pênc heb
mirdiyaq 32 û bona çarçofeyên
aliyê dinî şunwarê pênc heb mir-
diyaq û berbi rojava, bona çarço-
feyên paşiya şunwarê pênc heb
mirdiyaq çêkir. 33 Û mirdiyaqa
navîn, bona ku ji nava çarçofe-
yan ji seriyekî derbasî seriyê din
bike çêkir. 34 Û dora çarçofe-
yan bi zêr ve dagirt û ji bo mirdi-
yaqan, bona ku cîh bin, xelekên
zêrînî çêkir û dora mirdiyaqan bi
zêr ve dagirt.
35 Û perdê bi lacîwerd û erxewanî
û sor û bi kitana tenik ya hatiye
badan çêkir; wan bi kerûbiyên
karê hosta çêkir. 36 Û ji darcêwi-
yê jê re çar sitûnî çêkir û dora wan
bi zêr ve dagirt, çengelên wan zêr
bûn û bona wan, çar navkoyên zîvî
rijand[1]. 37 Û bona deriyê çadirê,
perdeyek karê neqqaş, ji lacîwerd
û erxewanî û sor û bi kitana tenik
ya hatiye badan 38 û çengelên
wê û pênc heb sitûnên wê çêkir û
dora serik û toqên wan bi zêr ve
dagirt û pênc heb navkoyên wan
tûnc bûn.

1 An jî: Darêjî kirin.

*Çêkirina Sindoqa Peymanê*

2.Mûs 25,10-22; 4.Mûs 10,33-36

37 Û Betsalel, sindoqê ji dar-
cêwiyê çêkir; dirêjiya wê
du gez û nîv û firehiya wê gezek
û nîv û bilindahiya wê gezek û nîv
bû. 2 Û dorên wê ji hundir û derve,
bi zêrê safî ve dagirt û perwazek
zêr li dora wê çêkir. 3 Û li ser her
çar koşên wê û bona aliyekî du xe-
lek û aliyê din jî du xelek hebin,
bona wê çar heb xelek rijand. 4
Û ji darcêwiyê piyan çêkir û dora
wan bi zêr ve dagirt. 5 Û bona
gerandina sindoqê piyan, derbasî
xelekên ku li dora sindoqê ne kir.
6 Û rûberê kefaretê ji zêrê safî çêkir;
dirêjiya wê du gez û nîv û firehiya
wê gezek û nîv bû. 7 Û du kerûbiyên
zêr çêkir; wan mîna karê qewart-
ger, li her du serên rûberê kefaretê,
8 bona ku li seriyekî kerûbiyek û li
seriyê din jî kerûbiyek hebin çêkir;
kerûbiyan li her du seriyên wê bi
rûberê kefaretê mîna yekpare bin
çêkir. 9 Û kerûbiyan bona ku rû bi
rû bin, baskên wan rûberê kefaretê
nuxumandin û bazikên wan ber ve
jor vegirt; wecên kerûbiyan berbi
rûberê kefaretê bûn.

*Maseya ku li ser nan tête pêşkêş kirin*

2.Mûs 25,23-30; 3.Mûs 24,5-9

10 Û sifrê ji darcêwiyê çêkir;
dirêjiya wê du gez û firehiya wê
gezek û bilindahiya wê gezek û
nîv bû. 11 Û derûdora wê, bi zêrê
safî ve dagirt û li dora wê per-
wazek zêr çêkir 12 û li dora wê
dorberek çar tillîk[1] çêkir û li dora
dorberê perwaza zêrîn çêkir. 13 Û
bona wê çar xelikên zêrînî rijand
û çar xelikî danî ser çar koşeyên
li ser çar lingî ne. 14 Xelekan
bona gerandina sifrê, bona ku ji
piyan re bibin cîh, nêzîkî qeraxa
bûn. 15 Û bona gerandina sifrê ji
darcêwiyê piyan çêkir û dora wan
bi zêr ve girt. 16 Û feraxên li ser
sifrê ne, sehan û kevçî û tasên wê
û cerên ku bona pêşkêşiyên rijan-
dinê ne, ji zêrê safî çêkir.

*Şimadank*

2.Mûs 25,31-40; Zek 4

17 Û şimadankê ji zêrê safî çêkir,
şimadankê, lingê wê û dîrega wê,
mîna karê darêjker çêkir; qedeh,
girêk û çîçegên wê ji wê bûn. 18
Û ji aliyekî şimadankê sê mil û li
aliyê dinî şimadankê jî sê mil, bi
tûmî şeş mil ji her du aliyên wê
derdiketin; 19 di milekî di şiklê
çîçega bihîfê de sê qedeh û girêkek
û çîçegek û li milê din jî, di şiklê
çîçega bihîfê de sê qedeh û girê-
kek û çîçegek hebûn; şeş milên ku
ji şimadankê derdiketin wusa bûn.
20 Û di şimadankê de çar qedehên
di şiklê çîçega bihîfê de û girêkên
wê û çîçegên wê hebûn 21 û bona
şeş milên ji şimadankê derdiketin,

1 Li rasteka menan binêrin.

di bin du milî de girêkek ji xwe û
di bin du milî de girêkek ji xwe û di
bin du milî de girêkek ji xwe hebûn.
22 Girên wê û milên wê ji wê bûn,
gişt ji zêrê safî û karê qewartkerek
bûn. 23 Û bona şimadankê ji zêrê
safî heft qendîlan, pelgezên fitîlan û
tableyan çêkir. 24 Wê û hemû taxi-
mên wê, ji talantek zêrê safî çêkir.

*Pêşkêşgeha Buxurê*

2.Mûs 30,1-10

25 Û selexana buxurê ji darcêwiyê
çêkir; dirêjiya wê gezek û firehiya
wê gezek, çarhawirdor yek bûn û
bilindahiya wê du gez bû; qiloçên
wê ji wê bû. 26 Dora wê, ser wê
û hawirdor aliyên wê û qiloçên
wê bi zêrê safî ve dagirt û ji dora
wê re perwazek zêr çêkir. 27 Bona
gerandina wê milan û bona milan,
di bin perwaza wê de, li ser her du
aliyên wê ji wê re du xelikên zêrînî
çêkir. 28 Û milan ji darcêwiyê çê-
kir û dorên wan bi zêrê ve girt. 29
Û karê ettar, rûnê pîroz ya meshê û
ji buharatê buxura xalis çêkir.

*Pêşkêşgeha Pêşkêşiyên Şewitandinê*

2.Mûs 27,1-8; 30,17-21

38 Û selexana pêşkêşiyên
şewatindinê ji darcêwiyê
çêkir; dirêjiya wê pênc gez û fire-
hiya wê pênc gez, çarhawirdor yek
bûn û bilindahiya wê sê gez bû.
2 Û qiloçên wê li ser çar koşeyên
wê çêkir; qiloçên wê, ji wê bûn
û wê bi tûncê ve nuxumand. 3 Û
hemû taximên selexanê, feraxan
û carûdan û leganan û çanqol û
qabên agir çêkir; hemû taximan
ji tuncê çêkir. 4 Û bona selexanê,
di bin perwazê de, ji tûncê bistek
mîna torê çêkir. 5 Û bona ku ji mi-
lan re bibin cîh, li çar koşên bistê
çar heb xelik rijand. 6 Û milan ji
darcêwiyê çêkir û dorên wan bi
tûncê ve girt. 7 Û bona ku bi milan
re selexanê bigerînin, wan derbasî
xelekên ku li kêlekan e kir; wê ji
textikan û hundirê wê vala çêkir.

*Qazan*

2.Mûs 30,18

8 Û qazanê ji tûncê û lingê wê ji
tûncê, ji mirêkên pîrekên ku bona
xizmetê li ber deriyê Çadira Ci-
vandinê çêkir.

*Hewşa Xanî*

2.Mûs 27,9-19

9 Û hewşê çêkir; bona aliyê başûr,
ber bi başûrê, sincokên wê, ji kita-
na ya tenika badayî, sed gez bûn;
10 dîregên wê bîst û navkoyên
wanî tûncî bîst heb bûn; çengel û
toqên dîregan zîv bûn. 11 Û bona
aliyê bakurê sed gez bû; dîregên
wê bîst û navkoyên wanî tûncî bîst
heb bûn; çengel û toqên dîregan zîv
bû. 12 Û bona aliyê rojava pêncî
gez sincok hebûn; dîregên wê deh
û navkoyên wan deh heb bûn; çen-
gel û toqên wan zîv bû. 13 Û bona

rojhilat, berbi rojhilatê pêncî gez
bû. 14 Sincok bona aliyekî deriyê
panzdeh gez bû; dîregên wê sisê û
navkoyên wê sê heb bû; 15 bona
aliyê dinî derî jî wusa bû û bona
deriyê hewşê, ji vî alî û ji aliyê din
sincok panzdeh gez bû, dîregên wê
sisê û navkoyên wê sê heb bû. 16 Li
dora hewşê ji kitana tenik ya hemû
sincokên wê hatibûn badayî bû. 17
Û bona dîregan navko ji tuncê û
rûyên çengel û toqên wê û serikên
wê ji zîvê bûn; rûyê hemû dîregên
hewşê bi zîvê ve hatibûn toq kirin.
18 Û bona deriyê hewşê perde, karê
neqqaş, ji lacîwerd û erxewanî û
sor û ji kitana tenik ya hatiye badan
bû; mîna sincokên hewşê dirêjiya
wê bîst gez û di firehiya wê de bi-
lindahî pênc gez bûn. 19 Û dîregên
wan çar bûn û çar navkoyên wan
ji zîvê bûn û çengelên wê ji zîvê û
rûyê serikan û toqên wan zîv bûn.
20 Û hemû singên şunwarê û yên
dora wê ji tûncê bûn.

*Amûrên ku hatine bikaranîn*

2.Mûs 35,4-10; 36,17

21 Hemû tiştên bona şunwarê, bona
şunwara şahdeyiyê ev in; ew li gor
emrê Mûsa; di bin destê Îtamarê
lawê Harûnê kahîn de, bi şuxula
Lêwiyiyan hatin jimartin. 22 Û
Betsalelê lawê Ûriyê, lawê Hûrê
ku ji eşîra Cihûda ye, hemû tiştên
ku XUDAN bona kirina wan emir
daye Mûsa, çêkir. 23 Û Oholîabê
lawê Ahîsamakê ku ji eşîra Dan e,
yê ku qewartker, hosta û di lacîwer-
dê de, erxewaniyê, sorê û di kitana
tenik de neqqaş e, bi wî re bû.
24 Hemû zêrê ku di hemû karên
cîhê pîroz de, bona kar hatiye serf
kirin, zêrê pêşkêşiyê, li gor şekelê
cîhê pîroz, bîst û neh talant û heft
sed û sîh şekel bû. 25 Û zîvê yên
ku ji civakê ve tên hesêb, li gor
şekelê cîhê pîroz sed talant û he-
zar û heft sed û heftê û pênc şekel
bûn; 26 bona şeş sed û sê hezar û
pênc sed û pêncî kesên ku bîst salî
û jê jortir in, bona her zilamê ku
derbasî aliyê kesên jimartîne bûyî,
li serê her kesê bekayek[1], yanê li
gor şekelê cîhê pîroz nîv şekel bû.
27 Û ev sed talant zîv, bona rijan-
dina navkoya cîhê pîroz û navko-
ya perdê bû, navkoyek bi talantek
bû û sed navko bi sed talantî bû.
28 Û ji hezar û heft sed û heftê û
pênc şekelî bona dîregan çengelan
çêkir û rûyê serikên wan girtin û
ji wan re toqan çêkir. 29 Û tuncê
pêşkêşiyê heftê talant û du hezar û
çar sed şekel bû. 30 Û bi vêya, de-
riyê Çadira Civandinê, navkoyên
wê û selexana tûnc û bona wê bis-
ta tûnc û hemû taximên selexanê
31 û navkoyên li dora hewşê û
navkoyên deriyê hewşê û hemû
singên şunwarê û hemû singên li
dora hewşêne çêkir.

[1] Li rasteka menan binêrin.

*Kincên Kahîn*

2.Mûs 28

39 Û bona xizmeta cîhê pîroz, kincên ji lacîwerd û erxewanî û sor ve tenik hatine rêsandin û bona Harûn kincên pîroz çêkirin; mîna ku XUDAN ji Mûsa re emir kiribû çêkirin.

*Efod*

2.Mûs 28,6-14

2 Û efod, ji zêr, lacîwerd û erxewanî û sor û kitana tenik ya ku hatiye badan ve çêkir. 3 Û zêr, di şiklên lewhayên zirav de kutan û bona ku di nava lacîwerd û erxewanî û sor û kitana tenik de, mîna karên hosta bineqişînin, têlan jêkirin. 4 Bona wê, serpîgehê hatine yek kirin çêkirin; ji her du serî ve hatibûn yek kirin. 5 Û şerîda bihuner hatiye rêsandin, ya ku li ser wê ye û ew pê re tê girêdan ji wê û mîna karê wê bû, ji zêr, lacîwerd û erxewanî û sor û kitana tenik ya ku hatiye badan bû. Mîna ku XUDAN emir dabû Mûsa çêkirin.

6 Û heqîqên ku li gor navê lawên Îsraêl bi qewartina mohrê hatine qewartin û li cîhên zêr ve hatine kutandin neqişandin. 7 Û ji ber, bona lawên Îsraêl bibin kevirên bîranînê, wan danîn ser serpiyên efodê; mîna ku XUDAN emir dabû Mûsa çêkirin.

*Sînggeh*

2.Mûs 28,15-30

8 Û sînggehê, mîna karê efodê, bi karekî hostayî ji zêr, lacîwerd û erxewanî û sor û kitana tenik ya ku hatiye badan çêkir. 9 Çarhawirdorên wê yek bû; sînggehê du qatî çêkirin; bi duqatî, dirêjiya wê gezek û firehiya wê gezek bû. 10 Û çar rêz kevir xistin hundirê wê. Rêzek heqîqa sor, yaqûta zer û zimrûd, rêza yekem bû 11 û rêza duwemîn, yaqûta gewez, yaqûta şîn û heqîqa sipî 12 û rêza sêwemîn yaqûta ezmanî, kevirê silêmanî û yaqûta mor 13 û rêza çaremîn zimrûdê ezmanî, heqîq û hêşînî bû; di cîhên xwe de, di hundirê çarçofeyên zêrînî de hatibûn bi cîh kirin. 14 Û kevir li gor navê lawên Îsraêl, bona donzdeh eşîrî, her yek li gor navê xwe, mîna qewartina mohrê, li gor navên wan donzdeh heb bûn. 15 Û li ser sînggehê ji zêrê safî, bi karê rêsegeran, zincîrên mîna qordonan çêkirin. 16 Û du heb cîhên zêr û du heb xelikên zêr çêkirin û her du xelekî danîn ser her du seriyên sînggehê. 17 Û her du zincîrên rêsayî, xistin her du xelekên li ser seriyên sînggehê ne. 18 Û seriyên din ên her du zincîrên rêsayî xistin hundirê du cîhî û wan danîn ser serpîgehên wê, yên ku li pêşiya efodê ne. 19 Û du xelekên zêr çêkirin û wan danîn ser her du seriyên sînggehê, danîn ser qeraxa

li aliyê hundirê efodê ye. 20 Û du
xelekên zêr çêkirin û wan danîn ser
her du serpîgehên ku li pêşiya efo-
dê, ji jêr li jora şerîda bi huner ve
hatiye rêsandin, nêzîkî cîhê efodê
yek dibin. 21 Û bona ku sînggeh
ji efodê neqete, şerîda efodê ya ku
bihuner hatiye rêsandin li ser wê
be, sînggehê bi xelekên wê bi xe-
lekên efodê, bi qordona lacîwerd
girê dan; mîna ku XUDAN emir
dabû Mûsa çêkirin.

*Kincên Kahînên din*

2.Mûs 28,31-35

22 Û fistanê efodê ji hemû
lacîwerdî, bi karê cûmker çêkir
23 û qula ku di nava fistan de bû,
bona ku neçire, li dora wê bi dor-
bergehê mîna qula zirxê kir. 24 Û
li ser dawên fistanê, ji lacîwerd û
erxewanî û sor û kitana tenik ya
ku hatiye badan hinaran çêkirin.
25 Û ji zêrê safî zengilkan çêkirin,
bona xizmetekê zengilkan li nava
hinaran, li ser dawên fistanê, bi
dorûber li nava hinaran, 26 ji bo
zengilkek û hinarek, zengilkek û
hinarek be, dorbedor li ser dawên
fistanê xistin; mîna ku XUDAN
emir dabû Mûsa çêkirin.
27 Û bona Harûn û lawên wî, ji
kitana tenik qutikên karê cûmke-
ran 28 û ji kitana tenik kofiya wê
û ji kitana tenik serikên bi xemil
û ji kitana tenik ya hatiye badan,
derpiyên kitan 29 û ji kitana tenik
ya ku hatiye badan û lacîwerd
û erxewanî û sor ve şûtika karê
neqqaş çêkirin; mîna ku XUDAN
emir dabû Mûsa çêkirin.
30 Û lewha taca pîroz, ji zêrê safî
ve çêkirin û li ser mîna qewarti-
na mohrê, nivîsa: Ji XUDAN re
pîroz! nivîsandin. 31 Û bona ku
li ser kofiyê girê bidin, qordonek
lacîwerd pê ve kirin; mîna ku XU-
DAN emir dabû Mûsa çêkirin.

*Temamkirina Kar*

2.Mûs 36-39

32 Bi vî awayî, hemû karên
şunwara Çadira Civandinê qedi-
ya û lawên Îsraêl, li gor her tiştên
ku XUDAN ji Mûsa re emir ki-
ribû çêkirin; wusa çêkirin. 33 Û
şunwarê, çadirê û hemû taximên
wê, qumçikên wê, çarçofeyên
wê, mirdiyaqên wê û dîregên wê
û navkoyên wê 34 û rûbera ku ji
eyarên beranan, yên ku bi boyaxa
sor in û rûbera ku ji eyarê delfina
ye û perda dabeşkirinê; 35 Sindo-
qa Şahdeyiyê û piyên wê û rûbera
kefaretê; 36 sifre, hemû taximên
wê û nanê aramiyê; 37 şimadanka
zêra safî, qendîlên wê, qendîlên
ku dê bên rêkirin û hemû taximên
wê û bona ronahiyê rûnê wê 38 û
selexana zêrîn û rûnê meshê û bu-
xura bêhnxweş û perda deriyê Ça-
dirê 39 û selexana tûnc û bista wê
ya tûnc, piyên wê û hemû taximên
wê, qazan û lingê wê; 40 sincokên

hewşê, dîregên wê û navkoyên
wan, perda deriyê hewşê, benên
wê û singên wê, bona Çadira Ci-
vandinê hemû haletên xizmeta
şûnwarê; 41 kincên tenik, yên ku
bona xizmet kirina cîhê pîroz û
bona kahîntiyê bikin, kincên pîroz
yên Harûnê kahîn û kincên lawên
wî, ji Mûsa re anîn. 42 Lawên Îs-
raêl, li gor her tiştên ku XUDAN
ji Mûsa re emir kiriye, hemû karî
wusa çêkirin. 43 Û Mûsa hemû
karî dît û a vay, wê kiribûn; XU-
DAN çawa emir dabû, wan wusa
kiribûn û Mûsa wan pîroz kir.

*Sazûman û Nezîrandina Çadira Hevdîtinê*

40 Û XUDAN ji Mûsa re
axifî û jê re got: 2 Tuyê di
roja yekemîn ya meha yekem de
şunwara Çadira Civandinê ava
bike. 3 Û tuyê Sindoqa Şahdeyiyê
deyne wir û Sindoqê bi perdeyekê
binixumîne. 4 Û tuyê sifrê bîne
hundir û tiştên ku li ser wê ne rêz
bike û şimadankê bîne hundir û
qendîlên wê vêxe. 5 Û tuyê bona
buxurê, selexana zêr deyne ber
Sindoqa Şahdeyiyê û perda deriyê
şunwarê pê ve ke. 6 Û tuyê selexa-
na pêşkêşiyên şewitandinê deyne
ber deriyê şunwara Çadira Civan-
dinê. 7 Û tuyê qazanê deyne nav-
bera Çadira Civandinê û selexanê
û avê têxe hundirê wê. 8 Û tuyê
hewşê li dorê deyne û perda deriyê
hewşê pê ve ke. 9 Û tuyê rûnê mes-
hê rahêle û şunwarê û hemû tiştên
ku di hundirê wê de ne mesh bike û
wê û hemû taximên wê pîroz bike
û dê pîroz bibe. 10 Û tuyê selexa-
na pêşkêşiyên şewitandinê û hemû
taximên wê mesh bike û selexanê
pîroz bike û dê selexane, bi zê-
deyî pîroz bibe. 11 Û tuyê qazan
û lingê wê mesh bike û wê pîroz
bike. 12 Û tuyê Harûn û lawên wî
bîne ber deriyê Çadira Civandinê
û tuyê wan bi avê ve bişo. 13 Û
tuyê kincên pîroz li Harûn bike û
bona ku kahîntiyê ji min re bike,
tuyê wî mesh û pîroz bike. 14 Û
tuyê lawên wî bîne û qutikan li
wan bike 15 û bona ku kahîntiyê
ji min re bikin, wekî te bavê wan
mesh kir, tuyê wan jî mesh bike û
mesh bûna wan, ji wan re di tûmi-
ya nifşeyên wan de bona kahîntiya
wanî abadîn e. 16 Û Mûsa bi vi
awayî kir; li gor her tiştên ku XU-
DAN jê re emir kiribû, wusa kir.
17 Û wusa bû ku, di sala duwemîn
de, di meha yekem de, di roja
yekemîn ya mehê de şunwar hate
ava kirin. 18 Û Mûsa şunwarê
ava kir û navkoyên wê xistê û
çarçofeyên wê çik kir û mirdiya-
qên wê danî û dîregên wê çikand.
19 Û çadirê bi ser şunwarê ve
vekêşand û rûberê çadirê ji aliyê
jor ve danî ser wê: Mîna ku XU-
DAN ji Mûsa re emir kiribû, hate
çêkirin. 20 Û şahdeyiyê rahişt û

xist hundirê Sindoqê û piyan bi
Sindoqê ve kir û rûberê kefaretê
ji aliyê jor ve danî ser Sindoqê
21 û Sindoqê anî hundirê şûnwarê
û perda dabeşkirinê daliqand û
Sindoqa Şahdeyiyê nixumand;
mîna ku XUDAN ji Mûsa re emir
kiribû, hate çêkirin. 22 Û sifrê
danî hundirê Çadira Civandinê,
danî aliyê bakura şunwarê, der-
veyî perdê. 23 Û li ber XUDAN,
li ser wê nan rêz kir; mîna ku XU-
DAN ji Mûsa re emir kiribû, hate
çêkirin. 24 Û şimadankê li hundirê
Çadira Civandinê, hemberî sif-
rê, aliyê başûra şunwarê ve danî.
25 Û li ber. XUDAN qendîlan
vêxist; mîna ku XUDAN emir
dabû Mûsa, hate çêkirin. 26 Û
selexana zêr danî hundirê Çadira
Civandinê, ber perdê 27 û li ser
wê buxura bêhnxweş şewitand;
mîna ku XUDAN ji Mûsa re emir
kiribû, hate çêkirin. 28 Û perda
deriyê şunwarê daliqand. 29 Û
selexana pêşkêşiyên şewitandinê
danî deriyê şunwara Çadira Ci-
vandinê û li ser wê pêşkêşiya
şewitandinê û pêşkêşiya nan
pêşkêş kirin; mîna ku XUDAN ji
Mûsa re emir kiribû, hate çêkirin.
30 Û qazanê danî navbera Çadi-
ra Civandinê û selexanê û bona
şuştinê avê xiste hundirê wê. 31 Û
Mûsa û Harûn û lawên wî dest û
lingên xwe li wir şuştin; 32 dema
diketin Çadira Civandinê û nêzîkî
selexanê dibûn, xwe duşuştin;
mîna ku XUDAN ji Mûsa re emir
kiribû, dikirin. 33 Û hewşê danî
dora şunwar û selexanê û per-
da deriyê hewşê daliqand. Bi vî
awayî Mûsa kar qedand.

*Ewrê li ser Çadira Hevdîtinê*

1.Qir 8,10-12

34 Wê gavê ewr, Çadira Civan-
dinê nuxumand û mezinahiya
XUDAN şunwarê dagirt. 35 Û
Mûsa hêz neanî ku têkeve Çadi-
ra Civandinê, ji ber ku ewr li ser
wî sekinîbû û mezinahiya XU-
DAN şunwarê dagirtibû. 36 Û
lawên Îsraêl, di hemû koçberiyên
xwe de, dema ewr ji ser şunwarê
dihat rakirin, koç dikirin; 37 lê
belê ger ewr nedihat rakirin, heta
roja ku bête rakirin koç nedikirin.
38 Ji ber ku di hemû koçên xwe
de, li ber çavên hemû mala Îsraêlê,
ewrê XUDAN, rojê li ser şunwarê
bû û şevê di wê de agir hebû.

# 3. MÛSA[1]

*Pêşgotin*

Pirtûka Lêwiyiyan, di derbarê qaîdeyên sazûmana peristina Îsraêla kevin û kahînên rêvebiriya vêya dikin, ên ku ji eşîra Lêwiyiyan hatine de ye.

Kitêb bi bingehîn daxuyaniya Pîroziya Xwedê û têkiliya gelê Îsraêlê ya bi Xwedayê Pîroz re dike. Ji nav ayetên di kitêbê de ne, ayeta ku herî tê zanîn, ya ku Îsa mîna emirê duwemîn yê girîng e, ayeta di 19:18'an de derbas dibe û dibêje: Tuyê mîna xwe ji cîranê xwe hez bike ye.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-7:38 | Zagonên di derbarê pêşkêşî û qurbanan de |
| 8:1-10:20 | Harûn û lawên xwe bi kahîntiyê têne wezîfedarkirin |
| 11:1-15:33 | Ji aliyê olê zagonên di derbarê gemarî û paqij hesibandinê de |
| 16:1-34 | Roja bexşandina gunehan |
| 17:1-27:34 | Zagonên di derbarê pîrozî û peristinê de |

*Pêşkêşiya Şewitandinê*

3.Mûs 1-7

1 Û XUDAN bangî Mûsa kir û
di Çadira Civandinê de pê re
axifî û got: 2 Ji lawên Îsraêl re
biaxife û ji wan re bibêje: Yekî
ji we, dema pêşkêşî ji XUDAN
re pêşkêş bike, hûn ê pêşkêşiyên
xwe ji heywanan, ji ga û dewaran
pêşkêş bikin.
3 Ger pêşkêşiya wî ji ganêr, ji
pêşkêşiya şewitandinê be, dê ew ê
ji heywanek nêr, ya bêqisûr pêşkêş
bike; ew ê bi xwe, li ber XUDAN,
bona ku hêja bibe dê li ber deri-
yê Çadira Civandinê pêşkêş bike.
4 Û dê destê xwe deyne ser serê
pêşkêşiya şewitandinê û ji bo,
bona wî kefaretê bibe, dê bête qe-
bûl kirin. 5 Û dê ganêrê ciwan li
ber XUDAN serjê bike û dê lawên
Harûn, kahînan xwînê pêşkêş
bikin û dê xwînê bi dor û bera li ser
pêşkêşîgeha ku li ber deriyê Çadi-
ra Civandinê ye bireşînin. 6 Û dê
pêşkêşiya ku hatiye şewitandin bi-

1 Lêwiyiyan, Qanûna Kahîntiyê, Zagona Kahîntiyê.

gurin û wî li gor perçên wî jêbikin.
7 Û dê lawên Harûnê kahîn agir
deynin ser pêşkêşîgehê û êzin-
gan li ser agir rêz bikin 8 û lawên
Harûn, kahînan, li ser êzingên ku
li ser agirê di pêşkêşîgehê de ne,
perçeyan, serî û bezê wê rêz bikin;
9 lê belê dê hundirê wan û serî bi
avê ve bişon. Û dê kahîn, giştikî,
pêşkêşiya şewitandinê, pêşkêşiya
ku bi agir ve tê kirin, ji XUDAN
re weki bêhna xweş be, li ser
pêşkêşîgehê bişewitîne.
10 Û ger wekî pêşkêşiya
şewitandinê be û pêşkêşiya wî ji
dewaran, ji mîhan an jî ji bizin-
an be, dê nêr,.wê bêqisûr pêşkêşî
bike. 11 Û wê li aliyê bakurê
pêşkêşîgehê, li ber XUDAN ser-
jê bike û lawên Harûn, kahînan
dê xwîna wê bi dorûber, li ser
pêşkêşîgehê bireşînin. 12 Û dê wê,
tevî ser û bezê wê, li gor perçên wê
jêbike û dê kahîn li ser êzingên ku
li ser agirê di pêşkêşîgehê de ne
rêz bike; 13 lê belê dê ew hundirê
wê û pêyên wê bi avê ve bişo û dê
kahîn hemûyan pêşkêş bike û li ser
pêşkêşîgehê wan bişewitîne; ev
pêşkêşiya şewitandinê; pêşkêşiya
ku bi agir ve tê kirin, ji bo XU-
DAN bêhna xweş e.
14 Û ger pêşkêşiya şewitandinê ya
ji XUDAN re yî, ji civîkan be, dê
wê gavê pêşkêşiya xwe ji qumri-
yan, an jî ji çêlkewan pêşkêş bike.
15 Û dê kahîn wê bîne pêşkêşîgehê
û serê wê bi neynûka xwe jêbike
û li ser pêşkêşîgehê wê bişewitîne
û xwînê li rûyê aliyê pêşkêşîgehê
ve birijîne 16 û dê geprûga wê
tevî pîsitiya wê veqetîne û wê
bavêje cîhê xweliyê ya ku li cem
pêşkêşîgehê, li ber bi rojhilatê ye
17 û dê wê tevî baskên wê bikşîne
û cuda bike, lê belê dê wê per-
çe perçe neke. Û dê kahîn wê di
pêşkêşîgehê de, li ser êzingên ku
li ser agir in bişewitîne; pêşkêşiya
şewitandinê, pêşkêşiya ku di agir
de hatiye çêkirin, ji XUDAN re
bêhna xweş e.

*Pêşkêşiya Zad*

3.Mûs 6,7-11

2 Û dema yek pêşkêşiya nan
pêşkêşî XUDAN bike, dê
pêşkêşiya wî ji arvanê zirav be
û dê rûn di ser wê de birijîne û
gunukê deyne ser wê 2 û dê wê ji
lawên Harûn, ji kahînan re bîne û
ji arvan, ji arvanê wî yî zirav û ji
rûnê wî, tevî hemûya gunuka wî,
divê di tijeyiya lepekî de be. Û
kahîn bi bîranîn bûna wî, dê wê
li ser pêşkêşîgehê bişewitîne; ew
pêşkêşiya ku bi agir ve hatiye kirin,
ji XUDAN re bêhna xweş e 3 û ya
ku ji ber pêşkêşiya nan ve bimîne,
bona Harûn û lawên wî ne; di nava
pêşkêşiyên ku ji XUDAN re bi agir
ve tê kirin, gellekî pîroz e.
4 Dema tu nanê ku di firnê de ha-
tiye çêkirin pêşkêşî bike, divê pî-

deyên ji arvanê zirav û bi rûn ve
hatine sitirandin, an jî nanê şikeva
yên bêhavên ên ku rûn li ser wan ve
hatine dayîn bin. 5 Ger pêşkêşiya
te, pêşkêşiya nanê ku di sêlê de
hatiye çêkirin be, dê ji arvanê zi-
rav ya bêhavên û bi rûn ve hatiye
sitirandin be. 6 Tuyê wê bi pari-
yan bike û rûn bi ser ve birijîne;
pêşkêşiya nan e. 7 Ger pêşkêşiya
te, pêşkêşiya nanê ku di miqilkê[1] de
hatiye çêkirin be, dê ji arvanê zirav
ve bête çêkirin. 8 Tuyê pêşkêşiya
zad ya ku ji van tiştan ve hati-
ye amade kirin, bona ku pêşkêşî
XUDAN bike, bîne û bide kahîn
û dê kahîn jî wê bibe pêşkêşîgehê.
9 Û dê kahîn, bona ku jê bîranî-
nek be, pariyek ji pêşkêşiya nan ve
rahêle, pêşkêşiya ku bi agir ve tête
kirin, bona ku ji XUDAN re bibe
pêşkêşiya bêhn xweş, dê wê li ser
pêşkêşîgehê bişewitîne. 10 Û yê
ku ji ber pêşkêşiya nan ve bimîne,
bona Harûn û lawên wî ne; di nava
pêşkêşiyên XUDAN, yên bi agir
ve tên kirin de gellekî pîroz e.
11 Divê tu pêşkêşiyên nan, yên
ku hûn ê pêşkêşî XUDAN bikin
bi havênê neyên çêkirin; ji ber ku
hûn ê ji bo pêşkêşiyên şewitandinê
ku ji XUDAN re pêşkêşî bikin,
qet hungiv û havênê neşewitînin.
12 Hûn ê vana ji XUDAN re, bi
pêşkêşiyên nûberê pêşkêş bikin;
lê belê dê bi bêhna xweşî daney-
nin ser pêşkêşîgehê. 13 Û tuyê
her yek pêşkêşîgehên nan bi xwê
bike û tuyê ji ser pêşkêşiyên nan,
xwêya peymana Xwedê kêm
neke; tuyê xwê pêşkêşî ser hemû
pêşkêşiyan bike.
14 Û ger tu pêşkêşiya nûberê
nan pêşkêşî XUDAN dike, bi
pêşkêşiya nanê nûberên xwe, si-
milê genimê di agir de hatiye ku-
tandin, tuyê ji genimê teze, yê ku
hatiye kutandin pêşkêş bike 15 û
tuyê rûn bi ser ve birijîne û tuyê
gunukê deyne ser wê; pêşkêşiya
nan e. 16 Û kahîn bona ku, ji bo
wê bîranîn be, dê pariyek ji ge-
nimê hatiye kutandin û rûnê wê,
tevî hemû gunukê bişewitînin;
pêşkêşiya ku ji XUDAN re, bi
agir ve hatiye kirin e.

*Pêşkêşiya Dilxweşiyê*

3.Mûs 7,11-36; 9,18-21

3 Û ger pêşkêşiya wî, qurbana
pêşkêşiya xweşiyê[2] be; ger ji ga
pêşkêş bike, divê nêr be an mê be,
wê[3] li ber XUDAN bêqisûr pêşkêş
bike. 2 Û dê destê xwe deyne ser
serê pêşkêşiya xwe û di deriyê Ça-
dira Civandinê de wê serjê bike û
lawên Harûn, kahînan dê xwînê
li dorûbera pêşkêşîgehê bireşînin.

1 An jî: Di tawê de.
2 Aştî, an jî: Silamet.
3 Wî, an jî: Wan.

3 Û dê ji qurbana pêşkêşiya
xweşiyê, ji XUDAN re pêşkêşiyek
bi agir ve hatiye kirin bête pêşkêşî
kirin; bezê ku dor li hundir girtine
û hemû bezê ku di hundir de ye
4 û her du gurçikan û bezê ku li
ber wan, li ber piştê ye û çermika
ku li ser kezebê ye tevî gurçikan
cuda bike. 5 Û lawên Harûn dê di
pêşkêşîgehê de, li ser pêşkêşiya
ku li ser êzingên ku li ser agir in
tê şewitandin, wê bişewitînin;
pêşkêşiya ku bi agir ve tê kirin, ji
XUDAN re bêhna xweş e.
6 Û ger pêşkêşiya wî, qurbana
ji pêşkêşiya ku bona XUDAN
pêşkêşiya xweşiyê[1], ji dewaran
be, divê nêr an jî mê be, bê qisûr
wê pêşkêş bike. 7 Ger pêşkêşiya
wî berxikek be, wê gavê dê wî li
ber XUDAN pêşkêş bike 8 û dê
destê xwe deyne ser serê wî û wî
li ber Çadira Civandinê serjê bike
û dê lawên Harûn, xwîna wî li
dorûbera pêşkêşîgehê bireşînin.
9 Û dê ji qurbanê pêşkêşiya
xweşiyê, ji XUDAN re pêşkêşiya
ku bi agir ve hatiye kirin pêşkêşî
bike; dê bezê wê, ji nêzîka kilêji-
yê, hemûya dûvê wê cuda bike
û bezê ku hundirê wê girtiye û
hemû bezê ku li ser hundirê wê
ye 10 û her du gurçik û bezê ku li
ser wan, li ber piştê ye û çermikê
ku li ser kezebê ye, tevî gurçikan
cuda bike. 11 Û kahîn dê wê li ser
pêşkêşîgehê bişewitîne; ev xwari-
na pêşkêşiya ku ji XUDAN re bi
agir ve hatiye çêkirin e.
12 Û ger pêşkêşiya wî bizinek
be, dê wê li ber XUDAN pêşkêş
bike 13 û dê destê xwe deyne ser
serê wî û wî li ber Çadira Civan-
dinê serjê bike û dê lawên Harûn,
xwîna wî li dorûbera pêşkêşîgehê
bireşînin. 14 Û dê bi pêşkêşiya
ku bi agir ji XUDAN re hatiye
kirinê, ji wê pêşkêş bike; bezê ku
hundirê wê girtiye û hemû bezê
ku li ser hundirê wê ye 15 û her
du gurçik û bezê ku li ser wan, li
ber piştê ye û çermikê ku li ser
kezebê ye, tevî gurçikan cuda
bike. 16 Û dê kahîn wan li ser
pêşkêşîgehê bişewitîne; ev xwa-
rina pêşkêşiya ku bi bêhnxweşî
bûnê bi agir ve hatiye çêkirin e;
hemû bez yên XUDAN in. 17 Dê
ev di tûmiya nifşeyên we de, di
hemû şunwarên we de, bibe zago-
na abadîn; hûn ê qet bezê hundirê
û xwînê nexwin.

*Pêşkêşiya Gunehê*

3.Mûs 6,17-23

4 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
jê re got: 2 Ji lawên Îsraêl re
biaxife û bibêje: Ger mirovek ji
hemû tiştên ku XUDAN emrê ne-
kirina wan dayiye, bi nezanî sûcekî
bike û yek ji wan bike; 3 ger kahînê
ku hatiye mesh kirin, sûcekî bike û

[1] Aştî, an jî: Silamet.

netewê jî bisûc[1] bike, wê gavê ji ber sûcê wî ji XUDAN re, wekî pêşkêşiya sûcê, ganêrekî ciwan û bêqisûr pêşkêş bike. 4 Û dê ganêr bîne ber deriyê Çadira Civandinê, ber XUDAN û destê xwe deyne ser serê ganêr û ganêr li ber XUDAN serjê bike. 5 Û kahînê ku hatiye mesh kirin, dê ji xwîna ganêrê rahêle û wê bîne Çadira Civandinê 6 û dê kahîn tilîka xwe di xwînê de dake û li ber perda cîhê pîroz, li ber XUDAN, heft carî ji xwînê bireşîne. 7 Û kahîn li ber XUDAN, xwînê di qiloçên pêşkêşîgeha buxura bêhn xweşê ya di Çadira Civandinê de yî de bide û hemûya xwîna ganêrê birijîne bin pêşkêşîgeha pêşkêşiyên şewitandinê ya ku li ber deriyê Çadira Civandinê de ye. 8 Û dê hemû bezê ganêrê ku pêşkêşiya sûcê yî, jê derxîne; bezê ku hundirê wê girtiye û hemû bezê ku li ser hundirê wê ye 9 û her du gurçikan û bezê ku li ser wan, li ber piştê ye û tevî gurçikan, çermikê ku li ser kezebê ye; 10 mîna ku ji ganêrê ku qurbanê pêşkêşiya xweşiyê yî, jê cuda bike û dê kahîn wan li ser pêşkêşîgeha pêşkêşiyên şewitandinê bişewitîne. 11 Û dê serê ganêr û hêta wê û eyarê wê û hemû goştê wê û hundirên wê û zibila wê, 12 hemûya ganêrê derxîne derveyî artêşgehê, cîhê paqij cîhê ku xwelî lê tê rijandin û wî li ser êzingan, bi agir ve vêxe, dê li cîhê ku xwelî lê tê rijandin bête şewitandin.

13 Û ger hemû civaka Îsraêlê xeletiyek bikin û ew kar ji ber çavên civakê bireve û karekî ku XUDAN bona nekirina wê emir daye bikin û bi sûc bibin; 14 dema karê ku kirine bête zanîn, dê civak bi pêşkêşiya sûcbûnê, ganêrekî ciwan pêşkêş bikin û dê wî bînin ber Çadira Civandinê. 15 Û dê kalepîrên civakê, li ber XUDAN destên xwe deynin ser serê ganêr û dê ganêr li ber XUDAN bête serjê kirin. 16 Û kahînê ku hatiye mesh kirin dê ji xwîna ganêrê rahêle û wê bîne Çadira Civandinê 17 û dê kahîn tilîka xwe di xwînê de dake û li ber perdê, li ber XUDAN, heft carî ji xwînê bireşîne. 18 Û ew li ber XUDAN, xwînê di qiloçên pêşkêşîgehê de ya di Çadira Civandinê de yî bide û hemû xwîna ganêrê birijîne bin pêşkêşîgeha pêşkêşiyên şewitandinê ya ku li ber deriyê Çadira Civandinê de ye. 19 Û dê hemû bezê ganêr jê derxîne û li ser pêşkêşîgehê bişewitîne. 20 Û çi li ganêrê ku pêşkêşiya sûcê yî kiribû, li vî ganêrî jî bike, dê ji wî re wusa bike û dê kahîn bona wan kefaretê bike û dê ji wan re bête efû kirin. 21 Û dê ganêr derxîne derveyî artêşgehê û mîna ganêrê berê şewitandibû,

[1] Biqebhet.

wî jî bişewitîne; ev bona civakê
pêşkêşiya sûcê ye.
22 Ger yek ji serokan sûcekî bike
û tiştekî ji tiştên ku XUDAN
Xwedayê wî emir kiriye ku neyê
kirin bike û bisûc bibe 23 û sûcê
ku kiribe, jê re bête gotin, wê
gavê dê bi pêşkêşîbûnê, nêriyekî
bêqisûr bîne. 24 Û destê xwe
deyne ser serê nêriyê û li cîhê ku
pêşkêşiyên şewitandinê serjê di-
kin, li ber XUDAN wê serjê bike;
pêşkêşiya sûcê ye. 25 Û kahîn
bi tilîka xwe ji xwîna pêşkêşiya
sûcê rahêle û wê li ser qiloçên
pêşkêşîgeha şewitandinê ve bide û
xwîna wê birijîne bin pêşkêşîgeha
pêşkêşiyên şewitandinê. 26 Û
dê hemû bezê wê mîna bezê[1]
pêşkêşiyên xweşiyê bişewitîne û
dê kahîn ji ber sûcê wî kefaretê
bike û dê jê re bête efû kirin.
27 Û ger yek ji gelên welat, bi ki-
rina tiştekî ku XUDAN bona neki-
rina wan emir daye, bi nezanî sûc
bike û sûcdar bibe; 28 gava sûcê ku
kiriye jê re bête gotin, wê gavê dê ji
ber sûcê ku kiriye, bi pêşkêşîbûnê
bizinek bêqisûr bîne. 29 Û des-
tê xwe deyne ser serê pêşkêşiya
sûcê û pêşkêşiya sûcê li cîhê ku
pêşkêşiyên şewitandinê serjê di-
kin, serjê bike. 30 Û kahîn, bi tilîka
xwe ji xwîna wê rahêle û wê li ser
qiloçên pêşkêşîgeha şewitandinê
ve bide û hemû xwîna wê birijîne
bin pêşkêşîgehê. 31 Û dê hemû
bezê wê mîna bezê[2] pêşkêşiyên
xweşiyê tête cuda kirin, cuda bike
û dê kahîn bi bêhna xweş bûnê wê
di pêşkêşîgehê de bişewitîne û dê
kahîn, bona wî kefaretê bike û dê
jê re bête efû kirin.
32 Û ger bona ku bibe pêşkêşiya
sûcê, pêşkêşiya xwe berxekî
bîne, dê yekî mê û bi bêqisûrî
bîne. 33 Û destê xwe deyne ser
serê pêşkêşiya sûcê û li cîhê ku
pêşkêşiyên şewitandinê serjê dikin,
wê wekî pêşkêşiya sûcê, serjê bike.
34 Û kahîn bi tilîka xwe ji xwîna
pêşkêşiya sûcê rahêle û wê li ser
qiloçên pêşkêşîgeha pêşkêşiyên
şewitandinê ve bide û hemû xwîna
wê birijîne bin pêşkêşîgehê. 35 Û dê
hemû bezê wê, mîna ji pêşkêşiyên
xweşiyê bezê berxikê tête cuda
kirin, cuda bike û kahîn, li gor
pêşkêşiyên XUDAN yên ku bi agir
ve têne kirin, wan di pêşkêşîgehê
de bişewitîne û ji ber sûcê ku kiriye
dê kahîn bona wî kefaretê bike û dê
jê re bête bexşandin

*Pêşkêşiya Sûcê*

3.Mûs 7,1-10

5 Û ger mirovek sûcekî bike
û dema pêşniyara sonda
şahdeyiyê bibihîze û tiştê ku dîti-
ye û bihîstiye negihîne, wê gavê

---

[1] An jî: Bez, yanê dûv.

[2] Dûvê.

dê neheqiyê hilgire. 2 An jî mi-
rovek li tiştekî mindar, divê laşê
cenawirek mindar, divê laşekî
heywanê mindar û divê him jî li
laşê heywanekî bi erdê ve dikişe
bikeve û hay jê nebe û ew bi xwe
mindar bibe, wê gavê dê sûcdar
bibe. 3 An jî mirov ji mindariyê;
çi bibe bila be, destê xwe li her ce-
lebê mindariyê ku wî mindar dike
bide[1] û hayê wî jê çênebe; dema bi
wê bizanibe, dê sûcdar bibe. 4 An
jî mirovek bona ku xerabiyê bike
an jî qenciyê bike, bê fikirandin bi
devê xwe sondê bixwe, her çi yê
ku mirov bêyî fikirandinê kiribe
bila bibe, hay jê çênebe, dema pê
bihese, dê ji van tiştan ji yekî ve
sûcdar bibe. 5 Û dê wusa bibe ku,
dema ji van tiştan ji yekî sûcdar
bibe, dê tiştê ku sûcê kiriye, mu-
kur[2] bê 6 û ji ber sûcê ku kiriye,
ji XUDAN re, pêşkêşiya xwe yî
sûcê, ji keriyê mêyek, berxikek
an jî bizinek, bi pêşkêşîbûna sûcê
bîne û ji ber sûcê xwe, dê kahîn
bona wî kefaretê bike.
7 Û ger bona berxê quweta wî ne-
gihêje, wê gavê bona pêşkêşiya
tiştê ku pê sûc kiriye û ya din jî
bi pêşkêşiya şewitandinê bîne,
ji XUDAN re du heb qumrî an
jî du heb çêlkew bîne. 8 Û dê
wan bîne cem kahîn û ew ê jî
pêşiyê ya ku pêşkêşiya sûcê yî,
pêşkêş bike û nêzîkî histuyê wê,
histuyê wê bi neynûka xwe ve jê
bike, lê belê serê wê jê neqetîne
9 û bila xwîna pêşkêşiya sûcê li
ser rûyê tenişta pêşkêşîgehê ve
bireşîne û xwîna ku ji ber mayi-
ye, dê li bin pêşkêşîgehê ve bête
rijandin; pêşkêşiya sûcê ye. 10 Û
dê ya duwemîn, bi pêşkêşîbûna
şewitandinê, li gor adetê[3] pêşkêş
bike û ji ber sûcê ku kiriye, dê
kahîn bona wî kefaretê bike û dê
jê re bête borîn.
11 Û ger quweta wî bona du qum-
rî an jî du çêlkewan negihêje,
wê gavê dê bona sûcê ku kiriye,
qasî pariyek ji deh pariyên efayê
arvanê zirav bîne; dê rûn bi ser
wê de nerijîne û gunukê daneyne
ser wê; ji ber ku pêşkêşiya sûcê
ye. 12 Û dê wê ji kahîn re bîne û
dê kahîn bi bîranînbûna wî, qasî
tijebûna lepekî ji wê rahêle û di
pêşkêşîgehê de li ser qurbanên
agir yên XUDAN bişewitîne;
pêşkêşiya sûcê ye. 13 Û di yekî
van tiştan de, kahîn ji berya sûcê
ku kiriye, kefaretê jê re bike û dê ji
wî re bête borîn û mîna pêşkêşiya
nan, yê ku ji ber bimîne, dê ji
kahîn re be.
14 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
jê re got: 15 Ger mirovek di tiştên

1 An jî: Destê xwe lê bixe.
2 Bila sûcê xwe îtiraf bike.
3 Ûsil, rêzik, an jî: Qaîde.

XUDAN ên pîroz de tecawuz û
bi nezanî sûcekî bike; wê gavê
dê pêşkêşiya gunehê li gor şekelê
cîhê pîroz û bi şekelê zîv, li gor
qîmeta ku te daniye, bona ku bibe
pêşkêşiya gunehê, ji XUDAN re
dê ji keriyê, beranekî bêqisûr bîne
16 û ji wan tiştên pîroz, dê berdêla
sûcê ku kiriye bide û dê ji pênc
pariyan pariyekî bi ser ve bixe
û bide kahîn û kahîn bi beranê
pêşkêşiya gunehê, bona wî kefa-
retê bike û dê jê re bête borîn.
17 Ger mirovek sûcekî bike û
tiştekî ku XUDAN bona nekiri-
na wê emir daye bike, ger niza-
nibe, dîsa jî sûcdar e û neheqiyê
li xwe dike. 18 Û ji kahîn re bi
pêşkêşîbûna gunehê, li gor qîme-
ta ku te daniye ji keriyê, beranekî
bêqisûr bîne û ji berya çewtiya ku
bi nezaniyê ve kiriye, dê kahîn
bona wî kefaretê bike û dê jê re
bête borîn. 19 Pêşkêşiya gunehê
ye, bi rastî ew zilam li ber XU-
DAN sûcdar e.

*Qaîdeyên Pêşkêşkirina Pêşkêşiyan*
3.Mûs 1; 4.Mûs 28,3-31

6 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 2 Ger kesek sûc bike û li
dijî XUDAN êrîşê bike û di tiştekî
emanet an rehîn an jî hatiye dizîn
de bi fenekî li cîranê xwe bike, an
jî zulmê li cîranê xwe bike, 3 an
jî tiştekî ku hatiye winda kirin bi-
bîne û di wê de fenekiyê bike, an
jî bi derewî sondê bixwe; di yekî
hemû van karên ku mirov dikin
de sûcê bike; 4 wê gavê ger sûc
kiribe û bi qebhet be, tiştê ku di-
ziye, an bi xedarî bi dest ve xisti-
ye, an jî jê re hatiye emanet kirin,
an jî ew tişt hatibe winda kirin û
ji aliyê wî ve hatibe dîtin, 5 an jî
tiştê ku di derheqê wê de bi de-
rewan sondê daye, dê şunda bide;
dê wê bitûmî şunda bide û ji pênc
parî, parekî bi ser wê bixe; ger ew
ya kî be, di roja ku gunehê wî ha-
tiye zanîn de, dê jê re bête dayîn.
6 Û ji XUDAN re pêşkêşiya gu-
nehê, li gor qîmeta ku te daniye,
ji keriyê beranekî bêqisûr, dê bi
pêşkêşîbûna gunehê ji kahîn re
bîne 7 û dê kahîn bona wî li ber
XUDAN kefaretê bike; ji hemû
karên ku kirine, tiştê ku pê sûcdar
bûye her çi be bila bibe dê jê re
bête borîn.
8 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û jê re got: 9 Emir bide Harûn
û lawên wî û bibêje: Zago-
na pêşkêşiya şewitandinê ev e:
Pêşkêşiya şewitandinê, dê hemûya
şevê, heta sibehê li ser agirê ku li
ser pêşkêşîgehê jî be û dê li ser
pêşkêşîgehê agirê wê vêxistî be.
10 Û dê kahîn, kincên xwe yî ki-
tanî li xwe bike; derpiyê xwe yî
kitan li ser bedena xwe bike û xwe
li ya pêşkêşa ku agir wê xwariye û
qedandiye ji ser pêşkêşîgehê rake
û wê deyne cem pêşkêşîgehê. 11 Û

dê kincê xwe derxe û kincekî din li
xwe bike û xweliyê derxe derveyî
artêşgehê, cîhekî paqij. 12 Û dê
agir li ser pêşkêşîgehê vêxistî be;
netefe û dê kahîn her sibehê li ser
wê êzing bişewitîne û pêşkêşiya
ku hatiye şewitandin, li ser wê rêz
bike û li ser wê jî rûnê pêşkêşiyên
xweşiyê bişewitîne. 13 Dê agir her
tim li ser pêşkêşîgehê vêketî be,
neyê vemirandin.
14 Û zagona pêşkêşiya nan ev e:
Dê lawên Harûn wê li ber XU-
DAN, li ber pêşkêşîgehê pêşkêş
bikin. 15 Û ji wê, ji arvanê zirav
yê pêşkêşiya nan û ji rûnê wê û ji
hemû gunukê ku li ser pêşkêşiya
nan wê bi tijehiya lepekî rahêje û
bona ku ji XUDAN re bibe bêh-
na xweş, bi bîranînbûna wî di
pêşkêşîgehê de bişewitîne. 16 Û
dê Harûn û lawên wî yê ku ji ber
bimîne bixwin; dê li cîhekî pîroz,
bê havên bê xwarin; li hewşa Ça-
dira Civandinê dê bixwin. 17 Dê
bi havênê ve neyê kelandin. Min
ji pêşkêşiyên xwe yî bi agir ve
têne çêkirin, wekî para wan vêya
dame wan; mîna pêşkêşiya sûcê
û mîna pêşkêşiya gunehê pîroz e.
18 Di tûmiya nifşeyên we de di
nava zarokên Harûn de, her zilam
ji pêşkêşiyên XUDAN ên ku bi
agir ve tên çêkirin, abadîn dê vêya
ji para xwe ve bixwin; her kesê ku
destî vana bide, dê bibe pîroz.
19 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 20 Di roja ku bên mesh ki-
rin de, pêşkêşiya ku dê Harûn û
lawên wî pêşkêşî XUDAN bikin,
ev e: Pêşkêşiya nanê her timî,
nêvî sibehê û nêvî êvarî, ji deh
pariyê efayê pariyekî arvanê zirav
e. 21 Dê di miqilkê de bi rûn ve
bête çêkirin, gava rûnê bi hemd
bikişîne, tuyê wê bîne hundir,
bona ku ji XUDAN re bibe bêh-
na xweş, tuyê pêşkêşiya nan mîna
pariyan û hatiye pijandin pêşkêş
bike. 22 Û dê vêya kahînê ku ji
nîjada Harûn hatiye mesh kirin,
pêşkêş bike. Bona ku ev bibe qaî-
deyek abadîn, dê ji bo XUDAN
bitûmî bête şewitandin. 23 Û dê
her pêşkêşiya nan yê kahîn bitûmî
bête şewitandin û neyê xwarin.
24 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 25 Bi Harûn û lawên wî re
biaxife û bibêje: Zagona pêşkêşiya
sûcê ev e: Pêşkêşiya sûcê, li
cîhê ku pêşkêşiya şewitandinê
tê serjê kirin, li ber XUDAN dê
were serjê kirin; gellekî pîroz e.
26 Dê kahînê ku bona sûcê pêşkêş
bike wê bixwe; li derekî pîroz; li
hewşa Çadira Civandinê dê bê
xwarin. 27 Dê her yekê ku destê
xwe lêxe bibe pîroz û ger ji xwîna
wê bipişke ser kincekî, tuyê tiştê
ku xwîn pişkiyayê, li cîhekî pîroz
bişo. 28 Û feraxa axînî ya ku goştê
qurbanê tê de hatiye kelandin, dê
bê şikandin; lê belê ger di feraxek
tûncî de hatibe kelandin, dê ew bête

firikandin. 29 Ji kahînan her mêr,
dê ji wê bixwin; zehf pîroz e. 30 Û
li cîhê pîroz; bona ku kefaretê bike,
tu pêşkêşiyên sûcê, yên ku ji xwîna
wê anîne Çadira Civandinê neyê
xwarin; di agir de bête şewitandin.

*Pêşkêşiya Sûcê*

3.Mûs 5,1-26

7 Û zagona pêşkêşiya gunehê ev
e; zehf pîroz e. 2 Dê pêşkêşiya
gunehê, li cîhê serjêkirina
pêşkêşiya şewitandinê serjê bikin
û Kahîn dê xwîna wê li dor û bera
pêşkêşîgehê bireşîne. 3 Û dê ew ê
hemû bezê wê pêşkêş bike, dûvê
bi bez û bezê ku dor û hundir gir-
tiye 4 û her du gurçika û bezê ku li
ser wan, li cem piştê yî û çermikê
li ser kezeba reş e, tevî gurçikan
dê cuda bike 5 û kahîn; bona ku
ji XUDAN re bibe pêşkêşiya
ku bi agir ve tête kirin, dê wan
di pêşkêşîgehê de bişewitînin;
pêşkêşiya gunehê ye. 6 Dê ji nav
kahînan her mêr ji wê bixwe; dê
li derekî pîroz bête xwarin; pîroz
e. 7 Pêşkêşiya sûcê çawa be, ya
gunehê jî wusa ye; bona wan za-
gonek heye; her kîjan kahîn, bi wê
kefaretê kiribe, dê ya wî be. 8 Û
kahînê ku pêşkêşiya şewitandinê,
ya zilamekî pêşkêş dike, dê eyarê
wê pêşkêşiyê ji xwe re rahêle. 9 Û
her pêşkêşiya nan, ya ku di firnê
de tête çêkirin û her tiştên ku di
miqilkê de an jî li ser sêlê tên çêki-
rin, dê bibe ya kahînê ku pêşkêşiya
wê dike[1]. 10 Û her pêşkêşiya nan
ya ku bi rûn ve hatiye sitirandin an
jî hişk e, dê di nav hemûyê lawên
Harûn de bi biratî bête par kirin.

*Pêşkêşiya Dilxweşiyê*

3.Mûs 3

11 Û zagona qurbanên pêşkêşiya
xweşiyê, ya ku zilamek pêşkêş
bike, ev e. 12 Ger wê bona şikiryê
pêşkêş bike, wê gavê divê tevî
qurbana şikiryê pîdeyên bêhavên,
yên ku ji arvanê zirav e û bi rûn
ve hatiye sitirandin û nanê sêlê ên
bêhavên, yên ku rûn tê de hatiye
dayîn û pîdeyên ku bi rûn ve ha-
tine sitirandin pêşkêş bike. 13 Dê
pêşkêşiya xwe bona şikiryê tevî
qurbanê pêşkêşiya xweşiyê, bi
nanê pîdeyên ku bihavên in were
pêşkêşî kirin. 14 Û ji wê, ji her
pêşkêşiyê yekî, dê bi pêşkêşiya ji
XUDAN re hatiye hilanîn pêşkêş
bike; dê pêşkêşiya xweşiyê bibe yê
kahînê ku xwîna wê reşandiye.
15 Û bona goştê qurbana pêşkêşiya
xweşiyê, ya ku bona şikiryê yî, dê
di roja pêşkêş kirinê de bête xwa-
rin; dê heta sibehê ji ber wê nehêle.
16 Lê belê qurbanê pêşkêşiya wî
ya qewil an jî pêşkêşiya ji dil be,
dê di roja ku qurbanê xwe pêşkêş
kiriye de bête xwarin û ya ku ji ber
mayiye, dê dotira rojê bê xwarin;

[1] An jî: Kiriye.

17 lê belê ya ku ji ber goştê qur-
banê ve mayiye, di roja sisêyan de,
dê di agir de bête şewitandin. 18 Û
ger roja sêwemîn ji goştê pêşkêşiya
xweşiyê were xwarin, dê neyê qe-
bûl kirin û dê ji yê ku wê pêşkêş
kiriye, neyê hesibandin; dê bibe
tiştê mekrûh û yê ku ji wê bixwe,
dê gunehê canê li xwe hilgire.
19 Û goştê ku bi her tiştê mindar
ve ketiye, dê neyê xwarin, di agir
de bête şewitandin. Û gava mirov
were goşt, dibe ku her kesê paqij
ji goşt ve bixwin.
20 Lê belê her canê ku mindariya
wî li ser wî ye û ji goştê qurbanê
pêşkêşiya xweşiyê ya XUDAN
bixwe, dê ji netewa xwe ve bête
avêtin. 21 Û ger kesek ji tiştekî
mindariya mirovan, an jî heywa-
nekî mindar, an jî ji tiştekî din yê
mindar mekrûh bikeve û wê wextê
ji pêşkêşiya XUDAN ya xweşiyê
bixwe, dê ew can ji netewa xwe
ve bête avêtin.

*Divê Rûn û Xwîn neyên xwarin*

22 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û jê re got: 23 Bi lawên Îsraêl re
biaxife û bibêje: Divê hûn tu bezî,
bezê ga an mîh, an jî yê bizinê
nexwin. 24 Û bezê heywanê ku bi
xwe miriye an jî parî parî bûye,
wekî din, bona her karî dibe bête
şuxulandin; lê belê divê hûn wê
nexwin. 25 Ji ber, her kî ku ji rûnê
heywanê ku wekî pêşkêşîbûna di
agir de ji XUDAN re tête pêşkêşî
kirin bixwe, dê ew can ji netewa
xwe ve bête avêtin. 26 Hûn êdi di
hemû şunwarên xwe de, dixwaze
bila yê civîkê be an jî yê heywan
be, bi tu cûreyî xwînê nexwin.
27 Xwîna çi be bila bibe, ger zi-
lamek xwînê bixwe, dê ew can ji
netewa xwe ve bête avêtin.

*Para Kahînan*

3.Mûs 10,12-15; 4.Mûs 18,8-11; 18,18-19;
2.Mûs 29,24-28

28 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û jê re got: 29 Bi lawên Îsraêl re
biaxife û bibêje: Yê ku qurbanê
xwe yî pêşkêşiyê pêşkêşî XUDAN
dike, dê pêşkêşiya xwe ji qurbanên
pêşkêşiya xweşiyê ji XUDAN re
bîne. 30 Dê destên wî pêşkêşiyên
XUDAN, yên ku bi agir ve tête ki-
rin bînin, dê dûvê tevî hêtê bîne, da
ku, bi pêşkêşiya hejandinê hêtê, li
ber XUDAN bête hejandin. 31 Û
dê kahîn dûvê li ser pêşkêşîgehê
bişewitîne û dê hêt ji Harûn û lawên
wî re bin. 32 Û ji qurbanên xwe yî
pêşkêşiya xweşiyê yî hêta rastê hûn
ê bona ku bibe pêşkêşiya rakirinê,
bidin kahîn. 33 Ji nav lawên Harûn
dê bi para yê ku pêşkêşiya qurba-
na xweşiyê de xwîn û dûvê pêşkêş
dike, dê hêta aliyê rastê ji wî re
be. 34 Ji ber ku min ji lawên Îs-
raêl re, ji qurbanên wanî pêşkêşiya
xweşiyê yî, hêta hejandinê û
hêta rakirinê stend û wan bi para

abadîn, ji lawên Îsraêl dan kahîn
Harûn û lawên wî. 35 Di roja ku
bona kahîntiyê bike, wan pêşkêşî
XUDAN kirin, ji pêşkêşiyên ku bi
agir ve bona XUDAN tête kirin,
para meshê ya Harûn û para mes-
hê ya lawên wî ev e; 36 bona ku
lawên Îsraêl vêya bidin wan di roja
ku wan mesh kirin de, XUDAN
emir da ku di tûmiya nifşeyên wan
de, abadîn para wan e.
37 Zagona pêşkêşiya şewitandinê
ya pêşkêşiya nan û pêşkêşiya sûcê
û pêşkêşiya gunehê û pêşkêşiya
tirxanê û qurbanê pêşkêşiya
xweşiyê ev e. 38 Di roja ku li çola
Sînayê, bona lawên Îsraêl qur-
banên xwe pêşkêşî XUDAN bikin
de, ji wan re emir hate dayîn ku,
XUDAN li Çiyayê Sînayê emrê
vêya da Mûsa.

*Harûn û Lawên xwe bi Kahîntiyê têne wezîfedar kirin*

2.Mûs 29

8 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û jê re got: 2 Harûn û tevî wî
lawên wî û kincan û rûnê meshê
û ganêrê ciwan yê pêşkêşiya sûcê
yî û her du beranî û selika nanê
bêhavên bigire cem xwe 3 û hemû
civakê li ber deriyê Çadira Civan-
dinê bicivîne! 4 Û Mûsa mîna ku
XUDAN emir dabû wî kir û civak
li ber deriyê Çadira Civandinê ci-
viya. 5 Û Mûsa ji civakê re got:
Tiştê ku XUDAN bona kirina wê
emir dayiye ev e.
6 Û Mûsa, Harûn û lawên wî anîn
û wan bi avê şuşt. 7 Û qutik li wî
kir û şûtikê bi pişta wî ve girê da
û xeftan lê kir û efodê lê kir û bi
şirîda efodê, ya ku bi huner ve ha-
tiye rêsandin dor û berê wî girt û
bi wê, efodê pê girê da. 8 Û sîng-
gehê danî ser wê û Ûrîm û Tûmîm
xistin hundirê sînggehê. 9 Û ko-
fiyê danî ser serê wî û taca pîroz,
lewha zêrîn danî ser kofiyê pêşiya
wê; mîna ku XUDAN emir dabû
Mûsa, kir. 10 Û Mûsa, rûnê mes-
hê rahişt û şunwarê û her tiştê ku
di hundirê wê de ne, mesh kirin û
wan pîroz kir. 11 Û ji wê, heft cara
li ser pêşkêşîgehê ve reşand û bona
ku wan pîroz bike, pêşkêşîgehê û
hemû taximên wê û qazanê û lingê
wê mesh kir. 12 Û ji rûnê meshê,
bi ser serê Harûn ve rijand û bona
ku wî pîroz bike, wî mesh kir. 13 Û
Mûsa lawên Harûn anî û qutikan[1]
li wan kir û şûtikan bi wan ve girê-
dan; mîna ku XUDAN emir dabû
Mûsa, kir.
14 Û ganêrê ciwan yê pêşkêşiya
sûcê yî anî û Harûn û lawên xwe
destên xwe danîn ser serê ganêrê
yê ku pêşkêşiya sûcê ye. 15 Û wê
serjê kir û Mûsa xwîna wê rahişt û
bi tilîka xwe li dor û bera qiloçên
pêşkêşîgehê ve da û pêşkêşîgehê
paqij kir û xwînê li binya kêşîgehê

1 Kirasan.

ve rijand û bona ji bo wê kefaretê
bike, wê pîroz kir. 16 Û hemû
bezên ku li ser hundirê wê ne û
zara kezeba reş û her du gurçika
û bezê wan girt û Mûsa wan di
pêşkêşîgehê de şewitand. 17 Lê
belê ga û eyarê wî û goştê wî û
sergoyê wî li derveyî artêşgehê bi
agir ve şewitandin; mîna ku XU-
DAN emir dabû Mûsa, kir.
18 Û beranê ku pêşkêşiya
şewitandinê ye, pêşkêş kir û
Harûn û lawên xwe destên xwe
danîn ser serê beran. 19 Û wî
serjê kir û Mûsa xwînê li dorûbe-
ra pêşkêşîgehê ve reşand. 20 Û
beran li gor pariyên wî jê kirin
û Mûsa, serî û pariyan û dûv
şewitandin. 21 Û yên hundir û pê
bi avê ve şuştin û Mûsa hemûya
beran di pêşkêşîgehê de şewitand;
pêşkêşiya ku bi bêhnxweşiyê tête
şewitandin[1] bû; pêşkêşiya ku bi
agir ve ji XUDAN re hatiye çê-
kirin bû; mîna ku XUDAN emir
dabû Mûsa, kir.
22 Û beranê din, beranê tirxanê
pêşkêş kir û Harûn û lawên wî,
destên xwe danîn ser serê beranê.
23 Û wî serjê kir û Mûsa ji xwîna
wî ve rahişt û li ser guçikê Harûn
ê rast, li ser tilîka wî ya serî, ya
destê rastê û li ser tilîka serî
ya lingê wî yî rastê ve da. 24 Û
lawên Harûn anî û Mûsa xwînê,
li ser guçikê wan ên rast, li ser
tilîkên serî ên destên wanî rastê û
li ser tilîkên serî yên lingên wan
ên rastê ne da û Mûsa xwînê li
dor û bera pêşkêşîgehê ve reşand.
25 Û bez û dûvê bi bez û hemû
bezê ku li ser hundirê wî ye û
zara kezeba reş û her du gurçi-
ka û bezê ku li ser wan e û hêta
rastê rahişt 26 û ji selika nanê
bêhavên ya ku li ber XUDAN e,
pîdeyek bêhavên û nanekî bi rûn
û nanekî şikeva rahişt û danî ser
bezan û ser hêta rastê. 27 Û giştikî
xist nav lepê Harûn û nava lepên
lawên wî û wan bi pêşkêşiya he-
jandinê, li ber XUDAN hejan-
din. 28 Û Mûsa wan ji ser lepên
wan rahişt û li ser pêşkêşiya ku
di pêşkêşîgehê de dişewite wan
şewitand; vana bi bêhnxweşbûnê,
pêşkêşiya tirxanê bûn; pêşkêşiya
ku bi agir ve ji XUDAN re çêdi-
kin bû. 29 Û Mûsa parxanê rahişt
û bi pêşkêşîbûna hejandinê wê li
ber XUDAN hejand; ji beranê tir-
xanê, ev para Mûsa bû; mîna ku
XUDAN emir dabû Mûsa, kir.
30 Û Mûsa ji rûnê meshê û ji xwî-
na ku li ser pêşkêşîgehê ye rahişt
û li ser Harûn, li ser kincên wî
û tevî wî li ser lawên wî û li ser
kincên lawên wî ve reşandin û
Harûn, kincên wî û tevî wî lawên
wî û kincên lawên wî pîroz kirin.
31 Û Mûsa ji Harûn û lawên wî
re got: Goşt di deriyê Çadira Ci-

1 An jî: Hatiye şewitandin.

vandinê de bikelînin; mîna ku bi
gotina, dê Harûn û lawên wî wê
bixwin emir dame, wê û nanê ku
di selika tirxanê de ye, li wir bi-
xwin. 32 Û hûn ê yê ji ber goşt û
hestî mane, di agir de bişewitînin.
33 Û heta ku rojên tirxanê biçin
serî hûn ê heft rojî ji deriyê Çadi-
ra Civandinê ve dernekevin; ji ber
ku dê tirxana we heft roj bidome.
34 XUDAN bona ku ji bo we ke-
faretê bike, emir da ku bila mîna di
vê rojê de hatiye kirin bête çêkirin.
35 Û hûn ê bi şev û roj heft rojî
di deriyê Çadira Civandinê de bi-
sekinin û bona ku nemirin, hûn ê
emrê XUDAN bînin cîh; ji ber ku bi
vî awayî emir ji min re hate dayîn.
36 Û Harûn û lawên wî hemû tiştên
ku XUDAN bi navdîtiya Mûsa ve
emir dabû, anîn cîh[1].

*Kahîn dest bi wezîfa xwe dikin*

9 Û di roja heyştemîn de wusa
bû ku, Mûsa bangî Harûn û
lawên wî û kalepîrên Îsraêlê kir
2 û ji Harûn re got: Bona xwe,
bi pêşkêşîbûna sûcê ji dewaran
golikek bêqisûr û bona pêşkêşiya
şewitandinê beranekî bêqisûr
rahêle û li ber XUDAN pêşkêş
bike. 3 Û tuyê bi lawên Îsraêl
re biaxife û ji wan re bibêje: Bi
pêşkêşîbûna sûcê nêriyekî û bona
pêşkêşiya şewitandinê golikek
yeksalî ya bêqisûr û berxikekî 4 û ji
bo pêşkêşiya selametê ya ku bona
li ber XUDAN bête qurban kirin
gayekî û beranekî û pêşkêşiya nan
ya ku bi rûn ve hatiye sitirandin
rahêlin; ji ber ku dê îroj XUDAN
xwe nîşanî we bide. 5 Û tiştên ku
Mûsa emir dabû anîn ber Çadira
Civandinê û hemûya civakê nêzîk
hatin û li ber XUDAN sekinîn.
6 Û Mûsa got: Tiştê ku XUDAN
bona kirina wê emir daye ev e
û dê mezinahiya XUDAN xwe
nîşanî we bide. 7 Û Mûsa ji Harûn
re got: Nêzîkî pêşkêşîgehê bibe û
pêşkêşiya xwe yî sûcê û pêşkêşiya
xwe yî şewitandinê pêşkêş bike. Û
bona xwe û bona netewê kefaretê
bike û pêşkêşiya netewê pêşkêş
bike û bona wan kefaretê bike;
mîna ku XUDAN emrê daye bike.
8 Û Harûn nêzîkî pêşkêşîgehê bû
û golika pêşkêşiya sûcê ya bona
xwe yî serjê kir. 9 Û lawên Harûn
xwînê pêşkêşî wî kirin û tilîka
xwe di xwînê de dakir û li ser qi-
loçên pêşkêşîgehê ve kir û xwînê
li bin pêşkêşîgehê ve rijand 10 û ji
pêşkêşiya sûcê ve bez û gurçikan
û zara kezeba reş di pêşkêşîgehê
de şewitand; mîna ku XUDAN
emir dabû Mûsa kir. 11 Û goşt û
eyar, li derveyî artêşgehê de, di
agir de şewitandin.
12 Û pêşkêşiya şewitandinê ser-
jê kir û lawên Harûn, xwînê tes-
lîmî wî kirin û wê bi hawirdor

[1] Çêkirin, an jî: Kirin.

li ser pêşkêşîgehê ve reşand.
13 Û pêşkêşiya ku parî bi parî tête
şewitandin û serî dan wî û wan li
ser pêşkêşîgehê şewitandin. 14 Û
hundirê[1] wê û pêya wê şuştin û li
ser pêşkêşiya ku di pêşkêşîgehê
de tête şewitandin, wan jî
şewitandin.
15 Û pêşkêşiya netewê pêşkêş kir
û nêriyê ku bona netewê pêşkêşiya
sûcê yî rahişt û wî serjê kir û bona
sûcê mîna ya berê pêşkêş kir.
16 Û pêşkêşiya şewitandinê pêş-
kêş kir û wî li gor usilê kir.
17 Û pêşkêşiya nan pêşkêş kir û ji wê
lepê xwe tijî kir û xeynî pêşkêşiya
ku sibehê hatiye şewitandin wê li
ser pêşkêşîgehê de şewitand.
18 Ga û beranê ku bona netewê
pêşkêşiya xweşiyê ye jî serjê ki-
rin û lawên Harûn xwînê teslîmî
wî kirin û wê dor bi dor li ser
pêşkêşîgehê ve reşand, 19 bezên
ga û beranî, dûvê bi rûn û bezê
ku dora hundir girtiye û gurçikan
û zara kezeba reş jî teslîmî wî
kirin 20 û bezan danîn ser par-
xanan û bezan di pêşkêşîgehê de
şewitandin 21 û Harûn, parxanan
û hêta rastê bi pêşkêşiya hejan-
dinê li ber XUDAN hejand; mîna
ku Mûsa emir dabû kir.
22 Û Harûn, destên xwe ber bi ne-
tewê ve rakir û wan pîroz kir û paşî
ku pêşkêşiya sûcê û pêşkêşiyên
şewitandinê û pêşkêşiyên se-
lametê pêşkêş kir daket. 23 Û
Mûsa û Harûn ketin Çadira Ci-
vandinê û derketin û netewê
pîroz kirin û mezinahiya XU-
DAN, ji hemûya netewê re xuya
bû[2]. 24 Û ji ber XUDAN ve agir
derket û pêşkêşiya şewitandinê û
beza li ser pêşkêşîgehê ve xwar
û qedand û hemûya netewê, gava
dîtin qêriyan û bi ser wecê xwe
ve ketin.

*Mirina Nadab û Abîhû*

4.Mûs 3,2-4

10 Û lawên Harûn Nadab û
Abîhû, her du jî buxur-
dankên xwe rahiştin û agir xistin
wan û agirekî biyan ya ku XU-
DAN bona wê emir nedabû wan
pêşkêş kirin. 2 Û ji ber XUDAN
agirek derket û wan xwar û qe-
dand û li ber XUDAN mirin. 3 Û
Mûsa ji Harûn re got: Gotina ku
XUDAN: Ez ê ji yên ku nêzîkî
min werin pîroz bibim[3] û ez ê li
ber hemûya netewê mezintiyê
bibînim gotiye ev e. Û Harûn bê-
deng bû. 4 Û Mûsa, bangî Mîşaêl
û Eltsafanê ku lawên Ûzzîêlê apê
Harûn e kir û ji wan re got: Nêzîk
werin, birayên xwe ji ber cîhê
pîroz rakin derveyî artêşgehê. 5 Û

1 Tiştên hundirê wê.
2 An jî: Mezinahiya XUDAN xwe nîşanî hemûya netewê kir (da).
3 Bêm pîroz kirin.

nêzîk hatin û mîna ku Mûsa got
wan di nava qutikên wan de raki-
rin derveyî artêşgehê. 6 Û Mûsa
ji Harûn re û ji lawên wî Eleazar
û Îtamar re got: Porên xwe vene-
kin û kincên xwe neçirînin ku
hûn nemirin û bila XUDAN bi
hemûya civakê re hêrs nebe, lê
belê birayên we, hemûya mala Îs-
raêl, bila bi agirê ku XUDAN pê
xistiye bigirîn. 7 Û bona ku hûn
nemirin, hûn ê ji deriyê Çadira
Civandinê ve dernekevin; ji ber
ku rûnê meshê yê XUDAN li ser
we ye. Û mîna gotina Mûsa kirin.
8 Û XUDAN bi Harûn re axifî
û jê re got: 9 Tu û tevî te lawên
te, dema hûn bikevin Çadira Ci-
vandinê, bona ku nemirin, araq
û xemrê venexwin; dê di tûmi-
ya nifşeyên we de bibe zagona
abadîn, 10 da ku, hûn tiştê pîroz
û yê bêrêz, mindar û yê paqij ji
hev cuda bikin 11 û da ku, hemû
zagonên, XUDAN bi navberiya
Mûsa, ji lawên Îsraêl re gotiye
hînî wan bikin.
12 Û Mûsa ji Harûn û lawên wî
yên mane Eleazar û Îtamar re
got: Pêşkêşiya nan ya ku ji ber
pêşkêşiyên XUDAN, ên ku bi agir
ve tên kirin maye bigirin û wê bi
bêhavênî li cem pêşkêşîgehê bi-
xwin; ji ber ku pîroz e 13 û divê
hûn li derekî pîroz bixwin û ji ber
ku ji pêşkêşiyên XUDAN ên ku
bi agir ve tên kirin para te û para
lawên te yî; ji ber ku bi vî awayî ji
min re hate emir kirin. 14 Û par-
xana hejandinê û hêta rakirinê, tu
û lawên xwe û tevî te qîzên te, hûn
ê li cîhekî paqij bixwin; ji ber ku
ji qurbanên pêşkêşiyên selametê
ên lawên Îsraêl para te û bi para
lawên te ji te re hate dayîn. 15 Ji
bezan, tevî pêşkêşiyên ku bi agir
ve tên kirin, bona ku li ber XU-
DAN bi pêşkêşiya hejandinê dê
hêta rakirinê û parxana hejandinê
bînin û mîna ku XUDAN emir
daye, dê abadîn bibin yên te û tevî
te dê bibin yên lawên te.
16 Û Mûsa, gellek lêkolînê li ser
nêriyê pêşkêşiya sûcê kir û a vay,
ew şewitîbû û ji lawên Harûn
ên mane, ji Eleazar û Îtamar ve
hêrs bû û got: 17 Ma çima we
pêşkêşiya sûcê di cihekê pîroz de
nexwarin? Ji ber ku pîroz e û bona
ku hûn gunehê civakê hildin û li
ber XUDAN bona wan kefaretê
bikin, vêya daye we. 18 A vay,
xwîna wî neanîne hundirê çadira
pîroz; mîna ku emir dame, divê
we muheqeq wê di cîhê pîroz de
bixwarana. 19 Û Harûn ji Mûsa
re got: A vay, îroj li ber XUDAN
pêşkêşiya wanî sûcê û pêşkêşiya
ku tête şewitandin pêşkêş kirin û
tiştên mîna vêya hatin serê min û
ger îro pêşkêşiya sûcê xwaribama,
ma dê di çavê XUDAN de xweş
bihata xuyanî kirin? 20 Û dema
Mûsa vêya bihîst, xweş dît.

*Heywanên goştên wan têne xwarin û*
*yên ku nayên xwarin*
3.Mûs 20,25-26; 5.Mûs 14,3-19;
K.Şa 10,11-16

11 Û XUDAN bi Mûsa û Harûn
re axifî û ji wan re got: 2 Bi
lawên Îsraêl re biaxifin û ji wan re
bibêjin: Ji hemû heywanên ku li
wecê erdê, heywanên ku hûn ê bi-
karibin bixwin ev in. 3 Di nava hey-
wanan de hûn ê bikaribin hemûyên
ku neynûkên[1] wan çetelî û qelişî
ne û yên ku kawêjê[2] dikin bixwin.
4 Lê belê ji yên ku neynûkên wan
çetelî û qelişî ne û yên ku kawêjê
dikin divê hûn vana nexwin: Deve,
ji ber ku ew kawêjê tîne, lê belê ney-
nûkên wê ne çetelî ne, ji we re min-
dar e. 5 Û kurbeşkê zinarê, ji ber ku
ew kawêjê tîne, lê belê neynûkên
wê ne çetelî ne, ji we re mindar e.
6 Û keroşk[3], ji ber ku ew kawêjê
tîne, lê belê neynûkên wê ne çetelî
ne, ji we re mindar e. 7 Û beraz,
ji ber ku neynûk çetel û qelişiye,
lê belê kawêjê nîne, ew ji we re
mindar e. 8 Divê hûn ji goştên wan
nexwin û destên xwe li laşên wan
nexin; ew ji we re mindar in.
9 Hûn dikarin ji hemûyên ku di
avê de ne, vana bixwin: Di avê
de, di behrê de û di çeman de hûn
dikarin hemûyên bi perik û bi
pûl bixwin. 10 Û ji hemûyên ku
yên dikarin di avê de xwe tev de
bidin, ji heçî afirên bi can yên di
avê de ne, hemû yên ku bê pûl û
bê bazik, yên ku di behr û çeman
de ne, bona we mekrûh in 11 û dê
bona we mekrûh bibin; divê hûn ji
goştên wan nexwin û hûn ê laşên
wan mekrûh bihesibînin. 12 Di
avan de hemûyên ku bê pûl û bê
bazik in, bona we mekrûh in.
13 Û hûn ê ji civîkan, vana mek-
rûh bihesibînin: Qertel û başok û
civîka reş 14 û kulemar û li gor
cinsê wê teyrê baz 15 û li gor cinsê
wê her tewr qijak 16 û heştirme û
kund û pepûk 17 û kundê biçûk û
kersele û kundê mezin 18 û pûm
û zengilok û sîqalk 19 û legleg û
li gor cinsê wê şîrînşaho[4] û tûka
dimdim û şevşevik dê neyên xwa-
rin, vana mekrûh in.
20 Hemû buxikên ku li ser çar
pêlan dimeşin û bi bazik in, ji bo
we mekrûh in. 21 Lê belê hûn di-
karin ji heçî buxikên ku li ser çar
pêlan dimeşin û bi bazik in, ji yên
ku bona hol bibin li ser lingên wan
çîpên wan hene bixwin; 22 hûn ji
wan dikarin vana bixwin; li gor
cinsê wê kullî û li gor cinsê wê
solam[5] û li gor cinsê wê hargol[6]
û li gor cinsê wê hagob[7]. 23 Lê

1 Simên.
2 Kayîn.
3 Kerguh.
4 Masîxur.
5 Navê sê cinsê kulliyan e.
6 Navê sê cinsê kulliyan e.
7 Navê sê cinsê kulliyan e.

belê hemû buxikên ku çar pêlên
wan hene û bi bazik in ji bo we
mekrûh in.
24 Û hûn bi vana ve dibin mindar;
her kî destî laşê wan bide dê heta
êvarî mindar be; 25 her kî ku laşê
wan bikişîne, dê kincên xwe bişo
û heta êvarî mindar be. 26 Her
heywanan, ên ku sim çetel in û
yên simên wan ne qelişandî ne û
kawêjê nakin ji we re mindar in;
her zilamê ku destê xwe bi wan
bixe dê mindar bibe. 27 Û di nav
hemû heywanên ku li ser çar pêlan
dimeşin de, hemû heywanên ku li
ser pencikên xwe dimeşin ji we
re mindar in; her zilamê ku des-
tê xwe li laşê wan bixe, dê heta
êvarî mindar be. 28 Û yê ku laşê
wan bikişîne, dê kincên xwe bişo
û heta êvarî mindar be; ew ji we re
mindar in.
29 Û ji nava buxikên ku bi ser xwe
ve kaş dibin, vana ji we re min-
dar in: Xecxecok û mişk û li gor
cinsê wê beqê bejî 30 û anaka[1] û
koeh[2] û leta[3] û homet[4] û margîsk
e. 31 Di nava hemû heywanên ku
bi erdê ve kaş dibin ên ku ji we re
mindar in ev in, zilamê ku destê
xwe bi miriyên wan bixe, dê heta
êvarî mindar be. 32 Û yek ji wan
bi mirîtî, bi ser her çi ve bikeve,
dê ew mindar be; divê dar, ferax,
divê kinc, divê çerm, divê cilik[5],
her çi feraxê ku pê ve kar tê kirin
be bila bibe, divê wê têxin avê
û dê heta êvarî mindar be û wê
gavê paqij bibe. 33 Û her feraxê
axînî, yê ku ji wan ketiye hun-
dirê wê, her tiştê ku di hundirê
wê de ye, dê mindar bibe û divê
hûn wî feraxî bişkînin. 34 Ji her
xwarinên ku di wê de ne, yên ku
avê tevî bikin, dê mindar bibin
û hemû vexwarinên di feraxekî
wusa de bin, dê mindar bibin.
35 Û her tiştê ku laşê wan bikeve
ser wê, dê mindar bibe; dixwa-
ze firne be, dixwaze tifik be, dê
bête perçe kirin; ew mindar in û
dê ji we re mindar bibin. 36 Tenê
çavkanî û sarinca ku av tê de ye
dê paqij bin, lê belê yê destê xwe
li laşê wan bixe, dê mindar bibe.
37 Û ger ji laşê wan bikeve ser
tova ku dê bête çandin, ew paqij
e. 38 Lê belê ger avê deynin ser
tovê û laşê wan bikeve ser wê, dê
ew ji we re mindar be.
39 Û ger heywanekî hûn bikaribin
bixwin bimire, yê ku destê xwe li
laşê wê bixe dê heta êvarê mindar
bibe. 40 Û yê ku ji laşê wê bix-
we, dê kincê xwe bişo û dê heta
êvarê mindar bibe; yê ku laşê wê
bikişîne jî dê kincê xwe bişo û dê
heta êvarê mindar bibe.

1 Navê çar cinsê marmaroşka (gumgumoka) ne.
2 Navê çar cinsê marmaroşka (gumgumoka) ne.
3 Navê çar cinsê marmaroşka (gumgumoka) ne.
4 Navê çar cinsê marmaroşka (gumgumoka) ne.
5 Çûl.

41 Û hemû buxikên li ser erdê ve
kaş dibin mekrûh in, divê neyên
xwarin. 42 Hûn ê ji heçiyên buxi-
kên ku li erdê ve kaş dibin û yên
ku li ser çar piyan dimeşin û yên
gellek lingên wan hene nexwin; ji
ber ku ew mekrûh in. 43 Divê hûn
bi tuyê buxikên kaş dibin ve canê
xwe mekrûh nekin û bi wan, bona
ku hûn canê xwe gemarî bikin,
divê xwe mindar nekin. 44 Ji ber
ku Xwedayê we, XUDAN ez im
û xwe pîroz bikin û pîroz bibin;
ji ber ku ez pîroz im û divê hûn
bi tuyê buxikên li ser erdê tevgerê
dikin ve canên xwe mindar nekin.
45 Ji ber bona ku bibim Xwedayê
we, XUDANê ku we ji Misirê
derxistiye ez im; hûn ê jî pîroz bi-
bin, ji ber ku ez pîroz im.
46 Bona yê mindar ji yê paqij
û heywanê ku dikare bête xwa-
rin ji yê ku nayê xwarin ve cihê
bikin, 47 zagona heywan û civîk
û her afirê zindî, yê ku di avan de
tevgerê dike û li ser erdê ve kaş
dibe, ev e.

*Pakbûna Pîrekê*

Lûq 2,21-24

12 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Bi lawên Îsraêl
re biaxife û bibêje: Ger pîrekek
ducanî bimîne û zarokekî lawik
bîne dine, wê gavê dê heft roj
mindar be; mîna mindariya ro-
jên xwe yî keçxwîniyê[1], dê min-
dar be. 3 Û di roja heyştemîn
de dê lawik bête sunet kirin[2].
4 Û sîh û sê roj, dê paqijiya wê di
xwîna wê de bimîne û heta rojên
ku paqijiya wê tijî bibin, dê des-
tê xwe bi tu tiştekî pîroz neke û
nekeve perestgehê. 5 Lê belê ger
zarokekî qîz bîne dine, wê gavê
dê mîna ku di rojên keçxwîniya
xwe de, du hefte mindar bibe û
şêst û şeş roj paqijiya wê di xwî-
na wê de bimîne.
6 Û bona zarokê law an jî za-
roka qîz dema roja paqijiyê tijî
bibe, ji kahîn re wekî pêşkêşiya
şewitandinê berxikek yeksalî û
wekî pêşkêşiya sûcê çêlikek ke-
vokê, an jî qumriyekê bîne ber
deriyê Çadira Civandinê 7 û dê
kahîn wê li ber XUDAN qurban
bike û bona pîrekê kefaretê bike
û dê ji çavkaniya xwîna xwe paqij
bibe. Zarok dixwaze bila law be,
an jî qîz be, bona pîreka ku biwe-
lidîne[3] zagon ev e. 8 Û ger bona
berxikê hêza wê têr neke, wê gavê
yek wekî pêşkêşiya şewitandinê û
ya din wekî pêşkêşiya sûcê be, du
heb qumrî, an jî du heb çêlikên
kevokê bistîne û dê kahîn bona
wê kefaretê bike û dê paqij bibe.

1 Hayze, an jî: Heyze.
2 An jî: Dê çermikê penîsê wî bê sunet kirin.
3 Zarok bîne dinê.

*Zagona Nexweşiyên Çerman*
4.Mûs 12,10-15; 2.Qir 26,19-23

13 Û XUDAN bi Mûsa û
Harûn re axifî û got: 2 Di
zilamekî de, di çermê bedena wî
de werimek, an jî qalik, an jî le-
keyek ku dibiriqe hebe û di çermê
bedena wî de halê nexweşiya ci-
zamê[1] bigire, wê çaxê dê ji kahîn
Harûn re, an jî ji yekî lawên wî yên
kahîn re bête birin 3 û dê kahîn,
nexweşiya di çermê bedena wî
de bibîne; ger di cîhê ku nexweş
e de mû sipî bûbe û xuyaniya cîhê
nexweş, ji çermê bedenê kûrtir
be, nexweşiya wî cizamî ye û dê
kahîn wî bibîne û wî bi mindarî
bang bike[2]. 4 Û ger lekeya dibi-
riqe di çermê bedenê de gewr be û
xuyanîbûna wê ji çerm ne kurtir be
û mûyê wê gewr nebûbe, wê gavê
kahîn dê yê nexweş heft rojî bigire
5 û kahîn di roja heftemîn de dê wî
bibîne û a vay, ger di çavê kahîn de
nexweşî sekinîbe, nexweşî di çerm
de belav nebûbe, wê gavê dê heft
rojên din wî bigire 6 û dê kahîn
roja heftemîn carekî din li nexweş
ve binêre, ger birîn çilmisîbe, bi
rûxara çerm ve belav nebûbe, dê
yê nexweş mîna paqij bûyî bide
bang kirin; birîn tenê qaşilk e û dê
yê nexweş kincên xwe bişo û paqij
bête hesibandin. 7 Lê belê paşî ku
bona paqijiyê xwe nîşanî kahîn
da qalik di çerm de belav bibe, dê
xwe dîsa nîşanî kahîn bide 8 û dê
kahîn bibîne û a vay, ger qalik di
çerm de belav bûbe, wê gavê dê
kahîn wî bi mindarî bide bang ki-
rin; ji ber ku cizam e.
9 Dema di zilamekî de nexweşiya
cizamê hebe, wê gavê dê ji kahîn
re bibin 10 û dê kahîn bibîne û a
vay, ger di çerm de werma gewr
hebe û ger ew jî mû gewr kiribe û
di wermê de goştê sor ê zindî hebe,
11 cizama ku di çermê bedenê de
kevn bûyî ye, dê kahîn wî bi min-
darî bide bang kirin; dê wî negire,
ji ber ku mindar e. 12 Û ger cizam
di çerm de derkeve holê[3] û li gor
ku kahîn bi çavê xwe bikaribe bi-
bîne, ger cizam ji serî heta pêlan
dora hemûya çermê nexweş girti-
be, 13 wê gavê dê kahîn bibîne û
a vay, cizam li dora hemûya be-
dena wî girtibe, dê kahîn bi paqijî
yê nexweş bide bang kirin; gişt
gewr bûne, paqij e. 14 Lê belê ger
di wî de çermê sor bête dîtin, dê
mindar bibe. 15 Û dê kahîn goştê
sor bibîne û wî zilamî bi mindarî
bide bang kirin; goştê sor mindar
e; cizam e. 16 Ger sor bizivire û
gewr bibe, wê gavê dê were cem
kahîn 17 û dê kahîn wî bibîne û a
vay, ger nexweşî gewr bûbe, wê

1 Kotî.
2 An jî: Îlan bike.
3 Eşkere bibe.

gavê dê kahîn yê nexweş bi paqijî
bide bang kirin; paqij e.
18 Û kengê, dema di çermê bedenê
de pizikek şîfa dîtiyî hebe 19 û ger
di dêvila pizikê de werma sipî, an
jî lekeya sorikî û dibiriqe hebe,
dê wê gavê ji kahîn re bête nîşan
dayîn 20 û dê kahîn bibîne û a vay,
ger xuyanîbûna wê, ji çerm kurtir
be û mûyê wê sipî bûbe, wê gavê
dê kahîn wî zilamî bi mindarî bide
bang kirin; nexweşiya cizamê ye,
di pizikê de derketiye holê. 21 Lê
belê ger kahîn wî bibîne û a vay,
ger di wî de mûyê gewr tune be û ji
çerm ne kurtir be û ger çilmisî be,
wê gavê dê kahîn heft rojî wî bigi-
re 22 û ger ji çerm belav bibe wê
gavê dê kahîn wî bi mindarî bide
bang kirin; nexweşî ye. 23 Lê belê
ger leka ku dibiriqe di cîhê xwe de
bisekine û belav nebe, qaşikê pi-
zikê ye û dê kahîn wî paqij bide
bang kirin.
24 An jî dema di çermê bedenê
de şewta agir hebe û goştê şewtê
yê gewez, şiklê sipiyekî sorînî, an
jî lekeyek gewr û dibiriqe bigire;
25 wê gavê dê kahîn wê bibîne û
a vay; di leka ku dibiriqe de mû
gewr bûbe û nêrîna lekê ji çerm
kûrtir be, cizam e, di şewitê de der-
ketiye holê û dê kahîn wî bi min-
darî bide bang kirin; nexweşiya
cizamê ye. 26 Lê belê gava kahîn
wî dît, a vay, ger di leka ku dibi-
riqe de mû tune be û leke ne ji kûr
ve be û ew çilmisîbe, wê gavê dê
kahîn heft rojê wî bigire 27 û dê
kahîn di roja heftemîn de wî bi-
bîne; ger ji çerm belav bibe, wê
gavê dê kahîn wî bi mindarî bide
bang kirin; nexweşiya cizamê ye.
28 Û ger leka ku dibiriqe li cîhê
xwe sekinîbe, ger belav nebûbe
û çilmisî be, karê şewtê ye û dê
kahîn wî paqij bide bang kirin; ji
ber ku qalikê şewtê ye.
29 Ger di çeng an jî seriyê zilamekî
an jî pîrekekê de nexweşî hebe,
30 wê gavê dê kahîn nexweşiyê
bibîne û a vay, ger xuyabûna wê
ji çerm kurtir be û di wê de mûyê
zerik yê zirav hebe, wê gavê dê
kahîn yê nexweş bi mindarî bide
bang kirin; keçel e, cizama serî
an jî çengê ye. 31 Û dema kahîn
nexweşiya keçeliyê bibîne, a vay,
ger xuyabûna wê ji çerm ne kûr-
tir be û di wê de mûyê reş tune
be, wê gavê dê kahîn, kesê ku bi
nexweşiya keçeliyê ye, heft rojî
bigire 32 û dê kahîn di roja hef-
temîn de nexweşiyê bibîne û a
vay, ger keçelî belav nebûbe û di
wê de mûyê zer tune be û xuyabû-
na keçeliyê ji çerm ne kûrtir be,
33 wê gavê dê zilam bête kur ki-
rin, lê belê dê keçela wî kur neke
û dê kahîn zilamê keçel heft rojê
din bigire 34 û dê kahîn di roja
heftemîn de keçeliyê bibîne û a
vay, ger keçelî di çerm de belav
nebûbe û xuyabûna wê ji çerm ve

ne kûrtir be; wê gavê kahîn wî bi
paqijî bide bang kirin û dê zilam
kincê xwe paqij bike û paqij bibe.
35 Lê belê ger paşî paqijbûna wî,
keçeliya wî di çerm de belav bibe,
36 wê gavê dê kahîn wî bibîne û
a vay, ger keçeliya wî di çerm de
belav bûbe, dê kahîn li mûyê zer
negere; mindar e. 37 Lê belê ger
di çavê kahîn de keçelî sekinîbe
û di wê de mûyê reş derketibe;
keçelî baş bûye, zilam paqij e û dê
kahîn wî paqij bide bang kirin.
38 Û ger di çermê bedena zilamekî
an jî pîrekekê de lekeyên ku dibi-
riqin, lekeyên sipî ên ku dibiriqin
hebin; 39 wê gavê dê kahîn bibîne
û a vay, ger lekeyên ku dibiriqin
ên di çermê bedena wan de, sipiya
çilmisî be, hilweşandin e[1], di çerm
de derketiye holê, paqij e.
40 Û ger porê zilamekî ji serê
wî weşiyabe, ser tasik e; paqij e.
41 Û ger di pêşiya serê wî de porê
wî weşiyabe, enî tasik e; paqij e.
42 Lê belê ger di serî tasik de an
jî di eniya tasik de nexweşiya sipî
ya sorinî hebe, ya ku di serê wî yî
tasik de an jî di eniya wî yî tasik de
derketiye cizam e. 43 Wê gavê dê
kahîn wî bibîne û a vay, ger di serê
wî yî tasik de an jî di eniya wî yî
tasik de werma nexweşiyê, mîna
xuyabûna cizamê ya di bedenê de
sipî ya ku berbi sorê ve diçe be,
44 zilamê bi cizam e, mindar e, dê
muheqeq kahîn wî bi mindarî bide
bang kirin; nexweşiya wî di serê
wî de ye.
45 Û dê kincê zilamê ku bi wî re
nexweşiya cizamê heye, were çi-
randin û porên wî bên vekirin û dê
lêvên xwe yî jorîn bigirin û bi go-
tina: Mindar, mindar! biqêre. 46 Di
hemû rojên ku nexweşî tê de dido-
me de, dê mindar be; mindar e; dê
tena serê xwe rûne; şunwara wî dê
li derveyî artêşgêhê be.

*Zagonên di derbarê kufnikê de*

47 Û ger di kincekî de, dixwaze
bila di kincê rîs an jî di kincê ki-
tanî de be, 48 dixwaze di destmil
an jî di avoya kitan de, an jî divê
di ya rîs de; dixwaze di çermê de,
dixwaze jî di her yek pertalekî[2] ji
çermê ve hatiye çêkirin de, ger
nexweşiya cizamê hebe; 49 di
kinc de an jî di çerm de, dixwa-
ze di destmilê de, an jî di argaçê
de, an jî ji her tiştekî ji çerme de,
nexweşî ger ber bi keskê ve an jî
sorîniyê ve be, nexweşiya cizamê
ye û divê ji kahîn re bête nîşan
kirin. 50 Û dê kahîn nexweşiyê
bibîne û tiştê ku tê de nexweşî
heye heft rojî bigire 51 û di roja
heftemîn de dê nexweşiyê bibîne;
ger nexweşî dixwaze di destmilê
de, dixwaze di argaçê de, di kinc

1 An jî: Der bûne.

2 Alavekî.

efayê arvanê zirav û logek rûn 22 û
li gor ku destê wî digihêje du heb
qumrî an jî du heb çêlikên kevokê
rahêle û dê yek bibe pêşkêşiya
sûcê û yê din jî bibe pêşkêşiya
şewitandinê. 23 Û bona paqijiya
xwe, vana di roja heyştemîn de
li ber XUDAN, di deriyê Çadira
Civandinê de, dê bîne cem kahîn
24 û dê kahîn berxika pêşkêşiya
gunehê û logek rûnê rahêle û
dê kahîn wan wekî pêşkêşiya
hejandinê, li ber XUDAN bihejîne.
25 Û dê berxika pêşkêşiya gunehê
serjê bike û dê kahîn ji xwîna
pêşkêşiya gunehê rahêle û dê
kahîn bi ser nermika guhê rast û bi
ser tilîka serî yê destê rast û bi ser
tilîka seriyê lingê rastê yê zilamê
ku dê were paqij kirin ve bide.
26 Û dê kahîn ji rûn ve di lepê[1]
xwe yê çepê ve birijîne 27 û dê
kahîn bi tilîka xwe yî rastê ve ji
rûnê ku di lepê xwe yê çepê de ye,
li ber XUDAN heft carî bireşîne
28 û dê kahîn ji rûnê ku di lepê wî
de ye, bi ser nermika guhê rast û bi
ser tilîka serî yê destê rast û bi ser
tilîka seriyê lingê rastê yê zilamê
ku dê were paqij kirin, di ser xwîna
qurbana pêşkêşiya gunehê ye de
bide 29 û kahîn, dê rûnê ku di destê
wî de ye û zêde mayiye, li ber
XUDAN, bona ku ji wî re kefaretê
bike, bi ser serê zilamê ku dê were
paqij kirin ve bide. 30 Û li gor
ku destê wî digihêje ji qumriyan
an jî ji çêlikên kevokan yekî,
31 ger destê wî gihaştîbe ku derê, dê
yekê wekî pêşkêşiya sûcê û yê din
jî wekî pêşkêşiya şewitandinê, bi
pêşkêşiya nan ve pêşkêş bike û dê
kahîn, bona zilamê ku dê were paqij
kirin, li ber XUDAN kefaretê bike.
32 Di derheqê zilamê ku di wî de
nexweşiya cizamê heye de û bona
xwe paqij kirinê destê wî nagihêje
zagon ev e.

*Ji kufnikê xelasbûn*

33 Û XUDAN bi Mûsa û Harûn
re axifî û wusa got: 34 Dema
hûn bikevin welatê Kenanê ya
ku bi milkî ez ê bidim we, ger ez
nexweşiyê bixim xaniyekî warê
milkê we, 35 wê gavê dê xwediyê
malê were û ji kahîn re bigihîne û
bibêje: Ji min re xuyanî dibe ku,
di malê de tiştekî mîna nexweşiyê
heye. 36 Û dê kahîn emir bide û
bona ku hemûyên li malê ne min-
dar nebin, kahîn berî ku bikeve
û nexweşiyê bibîne dê xanî vala
bikin û paşî wê dê kahîn were û
xanî bibîne 37 û dê li nexweşiyê
binêre û a vay, ger nexweşî di şiklê
lekeyên şînoyî an jî sorikiyê de di
dîwarên xanî de bin û xuyabûniya
wan ji dîwêr ve kûrtir bin; 38 wê
gavê dê kahîn ji xanî, derkeve deri-
yê xanî û heft rojî xanî bigire. 39 Û
dê kahîn di roja heftemîn de şunda

1 Dest.

were û bibîne û a vay, ger nexweşî
di dîwarên xanî de belav bûbe;
40 wê gavê dê kahîn emir bide û
kevirên ku di wan de nexweşî hebin
dê wan bikişînin û dê wan li der-
veyî bajêr, bavêjin cîhekî mindar
41 û xanî ji hundir ve bi dorûberî
biqeşêrin û xerca ku qeşartine dê
li derveyî bajêr, birijînin cîhekî
mindar 42 û dê kevirên wekî din
rahêlin û deynin cîhên wan kevi-
ran û xercekî wekî din rahêlin û
xanî sîwax bikin.
43 Û ger paşî ku derxistina ke-
viran û qeşartina xanî û sîwaxê,
nexweşî di xanî de dîsa derke-
ve; 44 wê gavê dê kahîn bikevê
û bibîne û a vay, ger nexweşî di
xanî de belav bûbe, li malê ciza-
ma har e; mindar e. 45 Û dê xanî,
kevirên wê û oniyên wê û hemû
xerca xanî bişewite û dê wan der-
xîne derveyî bajêr, cîhekî mindar.
46 Di hemû rojên ku girtiye de,
yê ku ketiye xanî jî, dê heta êvarê
mindar bibe. 47 Yê ku di xanî de
rakeve, dê kincê xwe bişewitîne;
yê ku di xanî de xwariye jî dê kin-
cê xwe bişo.
48 Û dema kahîn bikevê û bibîne, a
vay, paşî ku li xanî sîwax hatiye ki-
rin; wê gavê kahîn dê xanî bi paqijî
bide bang kirin, ji ber ku nexweşî
derbas bûye. 49 Û bona ku xanî
paqij bike, du civîk û darê erzê û
sor û gîhayê zûfayê bigire 50 û dê
civîkekê di feraxa axînî de li ser
ava ku diherike serjê bike 51 û darê
erzê û gîhayê zûfayê û sorê û civî-
ka zindî rahêle û dê wan di xwîna
civîka ku hatiye serjê kirin û ava ku
dihereke de dakin û heft carî li xanî
biweşîne 52 û dê bi xwîna civîkê
û ava ku dihireke û civîka zindî û
darê erzê û gîhayê zûfa û bi sorê ve
xanî paqij bike. 53 Û dê civîka zin-
dî li derveyî bajêr, li beyarê berde;
bi vî awayî dê bona xanî kefaretê
bike û dê paqij bibe.
54 Di derheqê her tewrê nexweşiya
cizamê û keçel de 55 û nexweşiya
kincê û xanî 56 û werm û qalik û
lekeya ku dibiriqe, 57 ka kengê
mindar e û kengê paqij e, bona ku
bide hîn kirin, zagon ev e; zagona
cizamê ev e.

*Gemariya ji ber herikandina laş*

15 Û XUDAN bi Mûsa û
Harûn re axifî û got: 2 Bi
lawên Îsraêl re biaxifin û ji wan
re bibêjin: Dema di bedena zila-
mekî de şîp[1] hebe, ji berya şîpa
xwe mindar e. 3 Û di şîpa wî de
dê mindariya wî ev be: Ger bede-
na wî şîpa xwe biherikîne, an jî
beden bi şîpa wî bigire, dîsa min-
dariya wî ye. 4 Her livînê zilamê
ku şîpa wî heye li ser radikeve, dê
mindar bibe û her tiştê ku li ser
rûdinê, dê mindar bibe. 5 Û her
kî destê xwe li livînên wî bixe, dê

[1] Herikandin.

kincê xwe bişo û di avê de xwe
bişo û heta êvarê mindar be. 6 Û
yê ku li ser her tiştekî ku kesê şîpa
wî heye lê rûniştiye rûnê dê kincê
xwe bişo û di avê de xwe bişo û
heta êvarê mindar be. 7 Û yê ku
destê xwe li kesê ku şîpa wî heye
bixe, dê kincê xwe bişo û di avê
de xwe bişo û heta êvarê mindar
be. 8 Û ger yê ku şîpa wî hebe,
tûyî zilamekî paqij bike, wê gavê
dê ew zilam kincê xwe bişo û di
avê de xwe bişo û heta êvarê min-
dar be. 9 Û her zînê ku yê şîpa
wî heye lê rûniştiye, dê mindar
be. 10 Û yê ku destê xwe li her
yek tiştê ku di bin wê de ne bixe
dê heta êvarî mindar be û yê ku
wan tiştan bikişîne dê kincê xwe
bişo û di avê de xwe bişo û heta
êvarê mindar be. 11 Û yê ku şîpa
wî heye, beriya ku destê xwe di
avê de neçelqîne her bi kî bixe, dê
ew zilam kincê xwe bişo û di avê
de xwe bişo û heta êvarê mindar
be. 12 Û feraxa axînî ya ku kesê
şîpa wî heye destê xwe lê bixe,
divê bête perçe kirin û her feraxê
darînî di avê de bête çelqandin.
13 Û dema yê ku şîpa wî heye, ji
şîpa xwe paqij bibe, wê gavê dê
bona tehareta xwe ji xwe re heft
rojî bijmêre û dê kincê xwe bişo
û bedena xwe di ava ku diheri-
ke de bişo û paqij bibe. 14 Û di
roja heyştemîn de bona xwe dê
du qumrî, an jî du heb çêlikên ke-
vokan rahêle û dê were ber XU-
DAN, deriyê Çadira Civandinê û
wan bide kahîn 15 û kahîn dê yekî
ji wan wekî pêşkêşiya sûcê û ya
din wekî pêşkêşiya şewitandinê
pêşkêş bike û kahîn dê li ber XU-
DAN, ji ber şîpa wî, bona wî ke-
faretê bike.
16 Û ger ji zilamekî avik biheri-
ke[1], wê gavê dê hemûya bedena
xwe di avê de bişo û heta êvarê
dê mindar be. 17 Û her kinc û her
meşinê ku avik li ser heye, dê bi
avê ve bête şuştin û heta êvarê
mindar be. 18 Û ger zilamek bi
pîrekekê re rakeve û nêzîkî wê
bibe, divê her du jî bi avê ve xwe
bişon û heta êvarî mindar bin.
19 Û ger şîpa pîrekekê hebe û di
bedena wê de şîp xwîn be, heft roj
dê di mindariya xwe de bimîne û
her yê ku destê xwe li wê bixe,
dê heta êvarî mindar be. 20 Û her
tiştê ku di mindariya xwe de li ser
wan raketine, dê mindar bibin; her
tiştê ku li ser rûniştine jî dê mindar
bin. 21 Û her zilamê ku destê xwe
li livîna wê bixe, divê kincê xwe
bişo û di avê de xwe bişo û heta
êvarî mindar be. 22 Û her zilamê
ku destê xwe li her yek tiştekî ku
pîrek li ser rûniştiye ve bixe, divê
kincê xwe bişo û di avê de xwe
bişo û heta êvarî mindar be. 23 Û
ger tiştik li ser livîn an jî doşega ku

1 An jî: Tomav, ava mêraniyê jê de:keve.

pîrek li ser rûniştiye hebe, dema zi-
lam destê xwe li wî tiştî bixe, divê
kincê xwe bişo û di avê de xwe
bişo û heta êvarî mindar be. 24 Û
ger zilamek pê re rakeve û minda-
riya pîrekê derbasî wî bibe, dê heft
roj mindar bibe û her livîna ku li
ser raketiye, dê mindar bibe.
25 Û ger xeynî keçxwîniyê[1] gel-
lek roj şîpa pîrekê ya xwîn hebe,
an jî ji dema keçxwîniyê zêdetir
şîpa wê hebe; mindariya wê hemû
rojên şîpa wê dê bibin mîna rojên
keçxwîniyê; mindar e. 26 Her li-
vîna ku di rojên şîpa xwe de li ser
raketiye, dê jê re bibe mîna livîna
keçxwîniyê û her tiştê ku li ser
rûniştiye dê mîna mindariya keç-
xwîniyê mindar bibe. 27 Û her yê
ku destê xwe li van tiştan bixe dê
mindar bibe û divê kincê xwe bişo
û di avê de xwe bişo û heta êvarî
mindar be. 28 Lê belê ger ji şîpa
xwe paqij bibe, wê gavê dê bona
xwe heft rojî bijmêre û paşî wê dê
paqij bibe. 29 Û di roja heyştemîn
de, bona xwe dê du qumrî, an jî
du heb çêlikên kevokan rahêle û
wan bîne cem kahîn, deriyê Çadi-
ra Civandinê. 30 Û kahîn dê yekî
ji wan, wekî pêşkêşiya sûcê û ya
din wekî pêşkêşiya şewitandinê
pêşkêş bike û kahîn, dê bona wê,
ji ber mindariya şîpa wê li ber
XUDAN kefaretê bike.
31 Bi vî awayî hûn ê lawên Îsraêl
ji mindariya wan cihê bikin, da
ku, dema şunwara min ya ku di
nav wan de ye, mindar bikin, bila
di mindariya xwe de nemirin.
32 Zagona yê ku şîpa wî heye û
bi derketina ku jê avik derdikeve
mindar bûye 33 û ya pîreka ku di
dema xwe yî keçxwîniyê de ye û
yên zilam û pîreka ku di wan de
şîp heye û ya zilamê ku bi pîreka
mindar re raketiye ev e.

*Roja lêborandina gunehan*

Îbr 9,6-12; 10,5-18

16 Û dema nêzîkî ber XU-
DAN bûn, paşî mirina her
du lawên Harûnê ku mirî ne, XU-
DAN bi Mûsa re axifî 2 û XU-
DAN ji Mûsa re got: Bona ku her
tim nekeve cîhê pîroz, aliyê perdê
yê hundir, ber kefaretgeha ku li
ser Sindoqê ye, ji birê xwe Harûn
re bibêje, da ku, bila nemire, ji ber
ku ez ê li ser kefaretgehê di ewr
de xuyanî bibim. 3 Bila Harûn
bi vêya, wekî pêşkêşiya sûcê
ganêrekî ciwan û wekî pêşkêşiya
şewitandinê bi beranekî bikeve
cîhê pîroz. 4 Dê qutikê kitanî yê
pîroz li xwe bike û li ser wî der-
piyê kitanî hebe û bi şûtika kitanî
ve xwe girê bide[2] û kofiya kitanî
li xwe bipêçe; kincên pîroz ev in
û dê bedena xwe bi avê ve bişo

1 Hayze.

2 Bişidîne.

û wan li xwe bike. 5 Û ji civaka
lawên Îsraêl wekî pêşkêşiya sûcê
du heb nêrî û wekî pêşkêşiya
şewitandinê beranekî rahêjin.
6 Û dê Harûn, ganêrê ku pêşkêşiya
sûcê ye, ya bona xwe yî serjê bike
û dê bona xwe û mala xwe kefa-
retê bike. 7 Û dê du nêrî rahêle û
wan li ber XUDAN, li ber Çadira
Civandinê bisekinîne. 8 Û Harûn,
wekî pişkekî bona XUDAN û
pişkekî bona Azazel[1] be, dê li
ser du nêriyî pişkê bikişîne. 9 Û
Harûn, nêriyê ku bona XUDAN
pişk ketiye ser wî, dê pêşkêş bike
û wî wekî pêşkêşiya sûcê pêşkêş
bike. 10 Lê belê dê nêriyê ku
bona Azazel pişk li ser derketiye,
bona ku jê re kefaretê bike û ji bo
Azazel bi çolê ve berde, bi zindiyî
li ber XUDAN bisekinîne.
11 Û dê Harûn bona xwe, ganêrê
pêşkêşiya sûcê pêşkêş bike û dê
bona xwe û bona mala xwe kefa-
retê bike û ganêrê pêşkêşiya sûcê
ya bona xwe ye serjê bike. 12 Û
destên wî bi buxura bêhn xweş
û hûr hatiye eciqandin ve tijî, bi
tirafa agirê li ser pêşkêşîgeha ku
li ber XUDAN e û ji buxurekî tijî
rahêle û bîne aliyê hundir yê per-
dê 13 û bona ku ewrê buxurê li ser
kefaretgeha ku li ser şahdeyiyê ye
bigire, dê li ber XUDAN buxurê
deyne ser agir, da ku, bila nemi-
re 14 û dê ji xwîna ganêrê rahêle
û bi tilîka xwe, berbi rojhilatê ve
bireşîne û bi tilîka xwe, li ber ke-
faretgehê heft cara bireşîne.
15 Wê gavê dê nêriyê pêşkêşiya
sûcê yê ku bona netewê ye serjê
bike û dê xwîna wî bîne aliyê hun-
dir yê erdê û dê bi xwîna wî, wekî
bi xwîna ganêrê kiriye bike û wê
li ser kefaretgehê û li ber kefaret-
gehê bireşîne 16 û ji ber mindariya
lawên Îsraêl û ji ber gunehên wan,
ji ber hemû sûcên wan, dê bona
cîhê pîroz kefaretê bike û dê bona
Çadira Civandinê ya di nava min-
dariyên wan de bi wan re disekine
jî wusa bike. 17 Û dema bona cîhê
pîroz kefaretê bike bikevê, bona
xwe û bona mala xwe û hemûya
civaka Îsraêlê, heta ku kefaretê
bike û derkeve, dê tu kes di Ça-
dira Civandinê de tune be. 18 Û
dê hilkişe pêşkêşîgeha ku li ber
XUDAN e û bona wê kefaretê
bike û ji xwîna ganêr û ji xwîna
nêri rahêle û li dor û hêlên qiloçên
pêşkêşîgehê ve bide. 19 Û ji xwînê
bi tilîka xwe dê heft carî bireşîne
û dê ji mindariyên lawên Îsraêl wê
paqij bike û wê pîroz bike.
20 Û dema bona cîhê pîroz û Ça-
dira Civandinê û pêşkêşîgehê ke-
faretkirinê qedand, dê nêriyê zin-
dî pêşkêş bike 21 û dê Harûn her
du destê xwe deyne ser serê nêri-
yê zindî û hemû fesadî û hemû
guneh û hemû sûcên lawên Îsraêl

1 An jî: Cîh guhertin.

li ser wî mukur bê û vana deyne
ser serê nêrî û bi destê zilamê ku
hatiye amade kirin wî bi çolê ve
berde 22 û dê nêrî hemû fesadi-
yên wan di ser xwe de bikişîne
welatekî tenha[1] û dê ew ê nêriyê
li çolê berde.
23 Û dê Harûn bikeve Çadira Ci-
vandinê û dema ket cîhê pîroz,
kincê kitanî yê ku li xwe kiribû,
dê ji xwe bike û wan li wir bihêle
24 û dê li cîhekî pîroz bedena xwe
bi avê ve bişo û dê kincê xwe li
xwe bike û dê derkeve û pêşkêşiya
xwe yî şewitandinê û pêşkêşiya
netewê ya şewitandinê pêşkêş bike
û dê bona xwe û bona netewê ke-
faretê bike. 25 Û dê rûnê pêşkêşiya
sûcê di pêşkêşîgehê de bişewitîne.
26 Û zilamê ku bona Azazel nêrî
berdaye, dê kincê xwe bişo û be-
dena xwe di avê de bişo û paşî wê
dê bikeve artêşgehê. 27 Û bona ku
li cîhê pîroz kefaretê bike, nêrî û
ganêrê pêşkêşiya sûcê yê ku xwî-
na wî hatiye anîn, dê bi derveyî
artêşgehê ve bên birin û dê eyarên
wan û goştên wan û zibilên wan di
agir de bişewitînin. 28 Û zilamê ku
ew şewitandine, dê kincê xwe bişo
û bedena xwe di avê de bişo û paşî
wê dê bikeve artêşgehê.
29 Û dê bona we zagonek abadîn
be; di meha heftemîn de, di roja
dehemîn ya mehê de hûn ê canên
xwe nizm bikin û dixwaze bila di-
matî[2] be, an jî xerîbê ku di nav we
de mêvan be, hûn ê tu karî nekin;
30 ji ber ku di wê roja de bona ku
hûn werin paqij kirin, dê bona we
kefaret bête kirin; hûn ê li ber XU-
DAN ji hemû sûcên xwe bên paqij
kirin. 31 Bona we Sebta bitûmî ra-
westinê ye û divê hûn canên xwe
nizm bikin; zagona abadîn e. 32 Û
kahînê ku dê li dêvila bavê xwe,
bona ku kahîntiyê bike bête mesh
kirin û tirxan kirin, kefaretê bîne
cîh û dê kincê kitanî, kincê pîroz li
xwe bike 33 û dê bona Cihê Heri
Pîroz kefaretê bike û bona Çadira
Civandinê û bona pêşkêşîgehê dê
kefaretê bike û dê bona kahînan û
hemûya neteweya civakê kefaretê
bike. 34 Û ji berya hemû sûcên
wan, dê bona lawên Îsraêl di salê
de carekî, bona ku kefaretê bike,
bona we, dê ev bibe zagonekî
abadîn. Û mîna ku XUDAN emir
dabû Mûsa kir.

*Xwîn xwarin Qedexe ye*

1.Mûs 9,4; 3.Mûs 7,26-27; 5.Mûs 12,23-25

17 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Bi Harûn û lawên
wî re û bi hemûya lawên Îsraêl re
biaxife û ji wan re bibêje: Tiştê ku
XUDAN emir daye û gotiye ev e:
3 Ji mala Îsraêlê her kî di artêşgehê
de gayekî an jî berxikekê an jî bi-

---

[1] Cîhekî bêkes (tenha).

[2] Yanê ji gelê welêt.

zinekê serjê bike, an jî li derveyî
artêşgehê serjê bike 4 û wê bona
ku wekî pêşkêşiyek ji XUDAN re
pêşkêş kiriye neanîbe ber deriyê
Çadira Civandinê, ber şunwara XU-
DAN, dê ji wî zilamî re sûcê xwînî
bête hesibandin; xwînê rijandiye û
ew zilam dê ji nav neteweya xwe ve
bête avêtin; 5 da ku, lawên Îsraêl,
qurbanên xwe yî li beyara vekirî qur-
ban kirine bînin û wan ji XUDAN
re, ji deriyê Çadira Civandinê, ji
kahîn re bînin û wan wekî qurbanên
xweşiyê ji XUDAN re qurban bikin.
6 Û dê kahîn, xwînê di deriyê Çadira
Civandinê de li ser pêşkêşîgeha XU-
DAN ve bireşîne û donê ji XUDAN
re wekî bêhn xweşiyê bişewitîne.
7 Û êdî dê qurbanên xwe ji nêriyên[1]
ku li pêy wan zinê dikin re qurban
nekin. Ev ê bona wan di domahiya
hemû nifşeyên wan de bibe zagona
abadîn.
8 Û tuyê ji wan re bibêje: Ji lawên
Îsraêl an jî ji xerîbên ku di nava
wan de mêvan in, her kî pêşkêşiya
şewitandinê an jî qurbanê pêşkêş
bike 9 û bona ku wê ji XUDAN re
pêşkêş bike neyne deriyê Çadira
Civandinê, dê ew zilam ji nete-
weya xwe ve bête avêtin.
10 Û ji mala Îsraêlê, an jî ji xe-
rîbên ku di nav wan de mêvan e
her kî, her yek cûreyekî xwînê
bixwe, ez ê berbi canê ku xwînê
xwariye bizivirim û wî ji nav ne-
tewa wî bavêjim. 11 Ji ber ku canê
goşt di xwînê de ye û ez bona ku
wê li ser pêşkêşîgehê ji canê we re
kefaretê bikim, dam we; ji ber ku
yê ji ber canê kefaretê dike xwîn
e. 12 Bo vê yekê ji lawên Îsraêl
re gotim: Dê ji we, tu can xwînê
nexwe û xerîbê ku di nav we de
mêvan e dê xwînê nexwe. 13 Û ji
lawên Îsraêl an jî ji xerîbên ku di
nav we de mêvan in, her kî nêçîra
heywanekî tête xwarin, an jî civî-
kekî bike, dê xwîna wê birijîne û
bi axê ve dê wê bunuxumîne.
14 Ji ber ku dema em werin canê
her goştî, xwîna wê canê wê
ye; ji bona wê ji lawên Îsraêl re
gotim: Hûn ê xwîna tu cûreyê goşt
nexwin; ji ber ku canê her cûreyê
goşt xwîna wê ye; dê yê ku wê
bixwe, bête avêtin. 15 Û dixwaze
bila dimatî[2] be an jî xerîb be, her
canê yê ku laşê heywanê bi xwe
miriye an jî cenawir wê perçe kiriye
bixwe dê kincê xwe bişo û di avê
de xwe bişo û heta êvarî mindar
be; wê gavê dê paqij be. 16 Û ger
wan neşo û bedena xwe neşo, dê
wê gavê gunehê xwe bikişîne.

*Têkiliyên Qedexe*

3.Mûs 20,9-21

18 Û XUDAN bi Mûsa re
axifî û got: 2 Bi lawên Îs-

---

1 Mabûdên ku peristinê ji wan re dikin.

2 Gelê welêt.

zinekê serjê bike, an jî li derveyî
artêşgehê serjê bike 4 û wê bona
ku wekî pêşkêşiyek ji XUDAN re
pêşkêş kiriye neanîbe ber deriyê
Çadira Civandinê, ber şunwara XU-
DAN, dê ji wî zilamî re sûcê xwînî
bête hesibandin; xwînê rijandiye û
ew zilam dê ji nav neteweya xwe ve
bête avêtin; 5 da ku, lawên Îsraêl,
qurbanên xwe yî li beyara vekirî qur-
ban kirine bînin û wan ji XUDAN
re, ji deriyê Çadira Civandinê, ji
kahîn re bînin û wan wekî qurbanên
xweşiyê ji XUDAN re qurban bikin.
6 Û dê kahîn, xwînê di deriyê Çadira
Civandinê de li ser pêşkêşîgeha XU-
DAN ve bireşîne û donê ji XUDAN
re wekî bêhn xweşiyê bişewitîne.
7 Û êdî dê qurbanên xwe ji nêriyên[1]
ku li pêy wan zinê dikin re qurban
nekin. Ev ê bona wan di domahiya
hemû nifşeyên wan de bibe zagona
abadîn.
8 Û tuyê ji wan re bibêje: Ji lawên
Îsraêl an jî ji xerîbên ku di nava
wan de mêvan in, her kî pêşkêşiya
şewitandinê an jî qurbanê pêşkêş
bike 9 û bona ku wê ji XUDAN re
pêşkêş bike neyne deriyê Çadira
Civandinê, dê ew zilam ji nete-
weya xwe ve bête avêtin.
10 Û ji mala Îsraêlê, an jî ji xe-
rîbên ku di nav wan de mêvan e
her kî, her yek cûreyekî xwînê
bixwe, ez ê berbi canê ku xwînê
xwariye bizivirim û wî ji nav ne-
tewa wî bavêjim. 11 Ji ber ku canê
goşt di xwînê de ye û ez bona ku
wê li ser pêşkêşîgehê ji canê we re
kefaretê bikim, dam we; ji ber ku
yê ji ber canê kefaretê dike xwîn
e. 12 Bo vê yekê ji lawên Îsraêl
re gotim: Dê ji we, tu can xwînê
nexwe û xerîbê ku di nav we de
mêvan e dê xwînê nexwe. 13 Û ji
lawên Îsraêl an jî ji xerîbên ku di
nav we de mêvan in, her kî nêçîra
heywanekî tête xwarin, an jî civî-
kekî bike, dê xwîna wê birijîne û
bi axê ve dê wê bunuxumîne.
14 Ji ber ku dema em werin canê
her goştî, xwîna wê canê wê
ye; ji bona wê ji lawên Îsraêl re
gotim: Hûn ê xwîna tu cûreyê goşt
nexwin; ji ber ku canê her cûreyê
goşt xwîna wê ye; dê yê ku wê
bixwe, bête avêtin. 15 Û dixwaze
bila dimatî[2] be an jî xerîb be, her
canê yê ku laşê heywanê bi xwe
miriye an jî cenawir wê perçe kiriye
bixwe dê kincê xwe bişo û di avê
de xwe bişo û heta êvarî mindar
be; wê gavê dê paqij be. 16 Û ger
wan neşo û bedena xwe neşo, dê
wê gavê gunehê xwe bikişîne.

*Têkiliyên Qedexe*

3.Mûs 20,9-21

18 Û XUDAN bi Mûsa re
axifî û got: 2 Bi lawên Îs-

---

1 Mabûdên ku peristinê ji wan re dikin.

2 Gelê welêt.

raêl re biaxife û ji wan re bibêje:
Ez, Xwedayê we, XUDAN im.
3 Hûn ê mîna karên Misira ku
hûn tê de rûniştîbûn, nekin û bi
zagonên wan ve nemeşin û mîna
karê welatê Kenana ku ez we di-
bim wir, nekin û hûn ê bi zagonên
wan ve nemeşin. 4 Hûn ê bi dara-
ziyên min ve bikin û bona ku bi
wan bimeşin, hûn ê bi daraziyên
min bigirin; ez Xwedayê we, XU-
DAN im. 5 Bo vê yekê, hûn ê bi
darazî û zagonên min ve bigirin;
ger zilamek wan bîne cîh, dê bi
wan ve bijî; ez XUDAN im.
6 Ji we tu kes, bona ku tazîtiya wî
jê re veke tu carî dê nêzîkî meri-
vekî xwe yî pêş de tê ve neçe; ez
XUDAN im. 7 Tuyê tazîtiya bavê
xwe û dayika xwe veneke, dayi-
ka te ye; tuyê tazîtiya wê veneke.
8 Tuyê tazîtiya jina bavê xwe
veneke; ew tazîtiya bavê te ye.
9 Tuyê tazîtiya xwuşka xwe, ya
qîza bavê xwe an jî qîza dayika
xwe, dixwaze bila li malê hatibe
dinê an jî li derve hatibe dinê, tuyê
tazîtiya wan veneke. 10 Tazîti-
ya qîza lawê xwe, an jî qîza qîza
xwe, tuyê tazîtiya wan veneke,
ji ber ku tazîtiya wan yên te ne.
11 Tazîtiya qîza jina bavê te,
xwuşka te yî ji bavê te çêbûyî ye,
tuyê tazîtiya wê veneke. 12 Tuyê
tazîtiya xwuşka bavê xwe veneke;
ji ber ku meriva bavê te ya nêzîk e.
13 Tuyê tazîtiya xwuşka dayi-
ka xwe veneke; ji ber ku meriva
dayika te ya nêzîk e. 14 Tuyê ta-
zîtiya birayê bavê xwe veneke û
nêzîkî jina wî nebe, amojina te ye.
15 Tuyê tazîtiya bûka xwe veneke;
jina lawê te ye; tuyê tazîtiya wê
veneke. 16 Tuyê tazîtiya jina bi-
rayê xwe veneke; tazîtiya birayê
te ye. 17 Tuyê tazîtiya pîrekekê
û ya qîza wê veneke; qîza lawê
wê, an jî qîza qîza wê, bona ku
tazîtiya wê veke tuyê negire; ew
merivên nêzîk in; pespayetî ye.
18 Tuyê pîrekekê bi ser xwuşka
wê ve, bona ku çavnebaritiyê lê
bike, hîn ew zindî be li cem wê, ji
bo tazîtiya wê veke, tuyê negire.
19 Dema di mindariya keçxwînê
de be, bona ku tazîtiya wê veke,
tuyê nêzîkî pîrekekê nebe. 20 Û
xwe, bona ku bi jina cîranê xwe
ve mindar bike, tuyê nêzîkî wê
nebe. 21 Û bona ku ji bo Molek ji
agir ve derbas bike, tuyê ji nîjada
xwe ve nede û tuyê navê Xwe-
dayê xwe[1] xera neke; ez XUDAN
im. 22 Tuyê wekî ku bi pîrekê
re rakeve, bi zilam re ranekeve;
tiştekî sik e. 23 Û bi tu heywanî
re, bona ku xwe mindar bike, tuyê
ranekeve û pîrekek, bona ku bi
heywanekî re rakeve[2], dê li ber wî
nesekine; ev rezaletî ye.

[1] An jî: Navê Xwedayê xwe XUDAN.

[2] Cima bike.

24 Bi van tiştan ve xwe qet mindar
nekin; ji ber, neteweyên ku ji ber
we diqewirînim bi hemûyên van
tiştan ve mindar in 25 û welat min-
dar e; bo vê yekê ez li ser wî, li fe-
sadiya wî digerim û welat gelê xwe
verdişe. 26 Û dixwaze dimatî[1] be
an jî xerîbê ku di nav we de mêvan
be, hûn ê bi zagon û daraziyên min
ve bigirin û yekî ji hemû van tiştên
sik jî nekin; 27 ji ber, zilamên welêt
ên ku berî we bûn, hemû van tiştên
sik kirin û welat mindar bû; 28 da
ku, welat dema ku we wê mindar
kirin, mîna ku neteweyê berî we
verşiyaye we jî verneşe. 29 Ji ber
ku, her kî ji hemûyên van tiştên ku
sik in bike, canên ku vana çêkiri-
ne dê ji nav neteweyên wan ve bên
avêtin. 30 Bo vê yekê hûn ê bi emrê
min bigirin, da ku, hûn tu adetên
sik, ên ku berî we dihatin kirin, ne-
kin û xwe bi wan ve mindar nekin,
ez Xwedayê we, XUDAN im!

*Zagonên Dadî û Pîroziyê*

19 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Bi hemû civaka
lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re
bibêje: Hûn ê pîroz bibin; ji ber ku
ez Xwedayê we, XUDAN pîroz
im. 3 Her yekê ji we dê ji dayi-
ka xwe û bavê xwe ve bitirse û
hûn ê bi Sebtên min ve bigirin; ez
Xwedayê we, XUDAN im. 4 Ve-
negerin pûtan û bona xwe îlahên
rijandî çênekin; ez Xwedayê we,
XUDAN im.
5 Û dema hûn ê qurbana pêş-
kêşiyên xweşiyê ji XUDAN re
qurban bikin, hûn ê wê bona ku
meqbûl bibin qurban bikin. 6 Qur-
banê we di roja xwe de an jî dotira
rojê divê bête xwarin û ger heta
roja sêwemîn bimîne, divê di agir
de bête şewitandin. 7 Ger di roja
sêwemîn de pariyek jî bête xwa-
rin mekrûh e, dê neyê qebûl kirin
8 û yê ku wê bixwe, dê gunehê wê
bikişîne; ji ber ku tiştê XUDAN
yê pîroz xera kiriye û dê ew can ji
netewa xwe ve bête avêtin.
9 Û dema hûn zadê warê xwe
biçînin, tuyê quncikên zeviyê bi
tûmî neçîne û similên ku ji zad ve
bikeve nede hev. 10 Û tuyê di rez
birînê de rezê xwe bi tûmî nede
hev û mêwa rezê xwe, yê ku bike-
ve erdê nede hev; tuyê wan bona
xizan û xerîb berde; ez Xwedayê
we, XUDAN im.
11 Hûn ê nedizin û bi fenekiyê ve
nekin û ji hev re derewan nebêjin.
12 Û hûn ê bi navê min ve li cîhê
derewîn sondê nexwin û navê
Xwedayê xwe xera nekin, ez XU-
DAN im.
13 Tuyê neheqiyê li cîranê xwe
meke û neşelîne; heqê karker[2]
hemûya şevê, heta sibehê li cem

1 Gelê welêt.

2 An jî: Heqdestê karker.

xwe nehêle. 14 Tuyê naletê ji yê
kerr re neke û tilpekiyê daneyne
ber yê kor û tuyê ji Xwedayê xwe
ve bitirse; ez XUDAN im.
15 Di daraziyê de hûn ê neheqi-
yê nekin; tuyê xatirê yê xizan
nehesibîne û hurmetê ji xatirê yê
bi qudret meke û tuyê bi dadiyê
daraziyê ji cîranê xwe re bike.
16 Di nav neteweya xwe de tuyê
bi koşanî kirinê negere; li dijî
xwîna cîranê xwe tuyê ranebe ser
pêlan; ez XUDAN im.
17 Tuyê ji dil ve, ji birayê xwe ve
nekerihe; bona ku tu ji ber wî sûcê
nekişîne, muheqeq tuyê cîranê
xwe baş îkaz bike. 18 Tuyê tolê
hilnede[1] û li dijî lawên neteweya
xwe mûdê[2] negire û mîna xwe
tuyê ji cîranê xwe ve hez bike; ez
XUDAN im.
19 Hûn ê bi zagonên min ve bigi-
rin. Tuyê heywanên xwe yî ji du
celebî ne ga nede[3]; zeviya xwe bi
du cûreyên tovê neçîne û li ser te,
kincê ku ji du celebê qûmaşê ha-
tiye tevlihev kirin tune be. 20 Her
kî, nêzîkî pîrekekê bibe û ger ew
pîrek cariye be, destgirtiyê zila-
mekî be û ger fidya wê nehatibe
dayîn an jî nehatibe azad kirin, dê
bên ceza kirin, neyên kuştin, ji ber
ku pîrek ne bi azadî bû. 21 Û ew
zilam, dê pêşkêşiya gunehê, be-
ranê pêşkêşiya gunehê ji XUDAN
re, bîne ber deriyê Çadira Civan-
dinê. 22 Û kahîn, ji ber sûcê ku wî
kiriye li ber XUDAN, bi beranê
gunehê ve, bona wî kefaretê bike
û sûcê ku kiriye dê jê re bête bo-
randin.
23 Û kengê hûn bikevin welêt
û bona xwarinê her tewrê dar
biçikînin, wê gavê hûn ê mêwên
wan bêsunetiyan bihesibînin; dê
sê sal bona we bêsunet bin; dê
neyên xwarin. 24 Lê belê di sala
çaremîn de bona ku şikirî ji XU-
DAN re bête kirin, dê hemûya
mêwên wê pîroz bête hesibandin.
25 Û di sala pêncemîn de, bona
ku zadê xwe ji we re zêde bike,
hûn ê mêwên wê bixwin; ez Xwe-
dayê we, XUDAN im.
26 Hûn ê tu tiştî bi xwînê ve ne-
xwin; sêrbaziyê nekin û stêrnasi-
yê mekin. 27 Porên serê xwe gi-
lover jê nekin û tuyê kêlekên rîha
xwe jî xera neke[4]. 28 Hûn ê bona
miriyan di bedena xwe de birînan
venekin, nîşanê deqê li xwe ne-
kin; ez XUDAN im.
29 Bi fahîşe kirina qîza xwe wê
mindar neke, da ku, bila welêt
zinê neke û welat bi pespayetî ve
tijî nebe! 30 Hûn ê bi Sebtên min
ve bigirin û hurmetê ji Perestgeha
min re bikin! Ez XUDAN im.

---

1 Nestîne.
2 Kînê negire.
3 Yanê nekişînin, bera ser hev nedin, an jî: Li hev nede gayîn.
4 An jî: Tuyê kêlekên rîha xwe jê neke.

31 Venegerin cinovanan û nihêrt-
vanan[1] bona ku bibin mindar li
wan negerin; ez Xwedayê we,
XUDAN im.
32 Tuyê li ber por sipî rabe ser
pêlan û ji yê kal bûyî re hurmetê
bike û ji Xwedayê xwe ve bitirse;
ez XUDAN im.
33 Û ger di welatê we de xerîbek
bi te re bibe mêvan[2], hûn ê wî
mexdûr nekin. 34 Xerîbê ku bi we
re bibe mêvan, dê di nav we de
bibe mîna yê dimatî[3] û tuyê mîna
xwe ji wî hez bike; ji ber ku hûn li
welatê Misirê xerîb bûn; ez Xwe-
dayê we, XUDAN im.
35 Di daraziyê de, di qeysa dirêjî,
wezin û heban de hûn ê neheqi-
yê nekin. 36 Dê di we de terezi-
ya rast, kevirên rast, efaya rast û
hîna[4] rast hebe; ez Xwedayê we,
XUDANê ku we ji welatê Misirê
derxistiye me. 37 Û hûn ê bi hemû
zagonên min û bi hemû daraziyên
min ve bigirin û wan bikin; ez
XUDAN im.

*Berdêla Gunehê*

5.Mûs 17,2-7

20 Û XUDAN bi Mûsa re
axifî û got: 2 Tuyê ji lawên
Îsraêl re bibêje: Ji lawên Îsraêl û ji
xerîbê ku li Îsraêlê mêvan in, her
zilamê ku ji nîjada xwe ve bide
Molek, dê muheqeq bête kuştin;
dê gelê welat, bi keviran wî kevir
bikin[5]. 3 Û ez ê li dijî wî zilamî
bizivirim û wî ji nava netewa wî
ve bavêjim; ji ber, bona ku Pe-
restgeha min mindar bike û navê
minî pîroz xera bike, ji nîjada xwe
daye Molek. 4 Û dema ji nîjada
xwe bide Molek, gelê welêt, ger
wî ji nedîtinê bên[6] û wî nekujin,
5 wê gavê ez ê li dijî wî zilamî û
li dijî malbata wî bizivirim û wî
bona ku li pêy Molek zinê bike,
hemûyên ku li pêy wî zinê dikin;
ez ê ji nav neteweyên wan ve ba-
vêjim.
6 Û ez ê li dijî canê ku li pêy cin-
vanan û nihêrtvanan zinê bikin,
berbi wan ve dizivirin, bizivirim
û wî ji nav neteweya wî bavêjim.
7 Bona vêya xwe pîroz bikin û
pîroz bin; ji ber ku ez Xwedayê
we, XUDAN im. 8 Û hûn ê bi
zagonên min ve bigirin û wan
bikin; ez XUDANê ku we pîroz
kiriye me. 9 Ji ber ku her zilamê
ji bavê xwe re, an jî ji dayika xwe
re naletê kiriye, dê muheqeq bête
kuştin; ji bavê xwe re an jî ji dayi-
ka xwe re naletê kiriye; dê xwîna
wî di ser wî de be.
10 Û yê ku bi jina yekî din re zinê
bike, zilamê ku bi jina cîranê xwe
re zinê bike, him ew, him jî pîrek

1 Remildar, falnas hwd.
2 Bibe mêvanê te.
3 Gelê welêt.
4 Li rasteka menan binêrin.
5 An jî: Birecimînin.
6 Çav lê buxumînin.

dê muheqeq bên kuştin. 11 Yê ku
bi jina bavê xwe re raketiye, ta-
zîtiya bavê xwe vekiriye; dê her
du jî muheqeq bên kuştin; dê xwî-
na wan di ser wan de be. 12 Ger
zilamek bi bûka xwe re rakeve,
dê her du jî muheqeq bên kuştin;
rezaletiyê kirin, dê xwîna wan di
ser wan de be. 13 Û ger zilamek
wekî ku bi pîrekê re radikeve bi
zilamekî re rakeve, her du jî tiştekî
sik kirine, dê her du jî muheqeq
bên kuştin; dê xwîna wan di ser
wan de be. 14 Û zilamek, ger tevî
pîrekekê dayika wê jî bigire, pes-
payetî ye, bona ku di nav we de
pespayetî tune be ew û pîrekan dê
di agir de bên şewitandin. 15 Û
zilamê ku bi heywanekî re rakeve
dê muheqeq bête kuştin; divê hûn
heywan jî bukujin. 16 Û pîrekek,
bona ku nêzîkî heywanekî bibe
here cem wî, tuyê pîrekê û hey-
wan jî bukuje; muheqeq dê bên
kuştin û dê xwîna wan di ser wan
de be!

17 Û ger zilamek xwuşka xwe,
qîza bavê xwe an jî qîza dayika
xwe rahêle û tazîtiya wê bibîne,
pîrek jî tazîtiya wî bibîne; şermî
ye û dê li ber çavên lawên nete-
weyên xwe bên avêtin; tazîtiya
xwuşka xwe vekiriye; dê gunehê
xwe bikişîne. 18 Û ger zilamek
bi pîreka ku di halê keçxwînê
de ye rakeve û tazîtiya wê veke;
çavkaniya wê tazî kiriye û pîrek
çavkaniya xwîna xwe vekiriye;
dê her du jî ji nava neteweyên
xwe ve bên avêtin! 19 Û tuyê ta-
zîtiya dayika xwe, xwuşka xwe,
an jî xwuşka bavê xwe veneke; ji
ber ku merivê xwe yî nêzîk tazî
kiriye; dê gunehên xwe bikişîne!
20 Û zilamê ku bi amojina xwe re
raketiye, tazîtiya apê xwe vekiri-
ye; dê sûcên xwe bikişîne; dê bêyî
zarok bimire! 21 Û ger zilamek
jinbira xwe bigire, mindarî ye;
tazîtiya birayê xwe vekiriye; dê
bêyî zarok bin.

22 Û hûn ê bi hemû zagonên min û
bi hemû daraziyên min ve bigirin
û wan bikin; da ku, welatê bona
ku hûn ê lê rûnin ez ê we bibim
bila we verneşe! 23 Û hûn ê li gor
kevneşopên neteweyên ku ji ber
we qewirandime nemeşin; ji ber
ku hemûyên van tiştan kirin û ez
ji wan kerihîm. 24 Lê belê ji we re
gotim: Hûn ê erdên wan bi mêrasî
bigirin û ez ê wê, welatê ku şîr û
hungiv jê diherikin, bona ku bibe
milk, bidim we; ez yê we ji nete-
weyan cuda kirine, Xwedayê we,
XUDAN im. 25 Û hûn ê heywanê
paqij û yê mindar û civîka mindar
û ya paqij ji hev cuda bikin û hûn
ê bi heywanên ku bona we bi min-
darî ji hev cuda kirime, an jî civî-
kan, an jî bi her tiştên ku bi erdê
ve xîz dibin canên xwe sik nekin.
26 Û hûn ê ji min re pîroz bin; ji
ber ku ez, XUDAN, ez pîroz im û

bona ku hûn bibin yên min, min we ji neteweyan ve cuda kirin! 27 Û zilam an jî pîreka ku cinvan an jî nihêrtvan e, dê muheqeq bête kuştin; dê wan bi keviran ve birecimînin; dê xwînên wan bi ser wan ve bin!

*Qaîdeyên di derbarê Kahînan de*
Hêz 44,17-27

21 Û XUDAN ji Mûsa re got: Bi lawên Harûn re, bi kahînan re biaxife û ji wan re bibêje: 2 Bila xeynî merivên wan, yên ku nêzîkî wî ne, ji dayika wî û bavê wî û ji lawê wî û ji qîza wî û ji birayê wî, di nava neteweya wan de qet yek, bona mirî xwe mindar neke; 3 dikare bona nêzîkê xwe, xwuşka xwe yî hîn neçûye mêr jî xwe mindar bike. 4 Di nav netewa xwe de, wekî serek bona ku xwe xera bike dê xwe mindar neke. 5 Dê ji serê xwe pariyekî kur nekin û qeraxa rîhên xwe kur nekin û di bedenên xwe de birînan venekin. 6 Dê ji Xwedayê xwe re pîroz bin û navê Xwedayê xwe xera nekin. Ji ber ku pêşkêşiyên XUDAN ên ku bi agir ve tên pêşkêş kirin, nanê Xwedayê xwe ew pêşkêş dikin û dê ew pîroz bin. 7 Dê fahîşe an jî pîreka xerabûyî negirin û pîreka ku ji mêrê xwe ve hatiye berdan negirin; ji ber ku kahîn ji Xwedayê xwe re pîroz e. 8 Û tuyê wî pîroz bike; ji ber ku ew nanê Xwedayê te pêşkêş dike; dê bona te pîroz be; ji ber ku ez, XUDANê ku hûn pîroz kiriye, pîroz im. 9 Û ger qîza kahînekî bi fahşetî kirinê ve xwe xera bike, ûsa tê ku bavê xwe xera kiriye; dê di agir de bête şewitandin!

10 Û di nav birayan de, kahînê mezin, yê ku rûnê meshê bi serî ve hatiye rijandin û bona ku kincan li xwe bike hatiye tirxan kirin, dê porên xwe veneke û kincê xwe neçirîne 11 û dê neçe cem meytê miriyekî û bona bavê xwe û bona dayika xwe dê xwe mindar neke 12 û dê ji Perestgehê dernekeve û Perestgeha Xwedayê xwe xera neke; ji ber ku taca rûnê meshê ya Xwedayê wî, li ser wî bi xwe ye; ez XUDAN im. 13 Û pîreka ku bigire, divê qîz be. 14 Dê jina bî, an jî hatiye berdan, an jî pîreka xerabûyî, fahîşe nestîne; tenê bona ku ji xwe re bike jin, dê ji neteweya xwe ve qîzekê rahêle. 15 Û di netewa xwe de dê nîjada xwe xera meke; ji ber ez XUDANê ku wî pîroz kiriye me.

16 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 17 Bi Harûn re biaxife û bibêje: Di nîjada te de, di tûmiya nifşeyan de her di kî de qisûr hebe, bila bona ku nanê Xwedayê xwe pêşkêş bike nêzîk neyê. 18 Ji ber, tu zilamê ku tê de qisûr hebe, dê nikaribe nêzîk were; kor, an jî kûd, an jî poz pahn, an jî zilamê ku zêdeyiya wî heye,

19 an jî ling şikestî, an jî destê wî
şikestî, 20 an zilamê bûl, an jî kinik,
an çav bi qisûr, an keçel, an bi qalik,
an jî gunik[1] eciqandî, 21 di nîjada
Harûn de tu kesê ku di wî de qisûr
heye, bona pêşkêşiyên XUDAN ên
ku bi agir ve tên çêkirin, divê nêzîk
nebin; di wî de qisûr heye; bona ku
nanê Xwedayê xwe pêşkêş bike, dê
nêzîk neçe. 22 Dê ji nanê Xwedayê
xwe, ji yê ku herî pîroz e û ji yê ku
pîroz e bixwe; 23 lê belê dê neçe
cem perdê û nêzîkî pêşkêşîgehê
nebe, ji ber ku di wî de qisûr heye;
da ku, bila Perestgeha min xera
neke, ji ber ku ez XUDANê ku wan
pîroz kiriye me. 24 Mûsa ji Harûn re
û ji lawên wî re û ji hemûya lawên
Îsraêl re bi vî awayî got.

22 Û XUDAN bi Mûsa re
axifî û got: 2 Ji Harûn re û
lawên wî re bibêje: Bila ji tiştên
pîroz ên ku lawên Îsraêl ji min
re pîroz dikin ve xwe biparêzin
û navê minî pîroz xera mekin, ez
XUDAN im. 3 Ji wan re bibêje:
Ji tiştên pîroz ên ku lawên Îsraêl
ji min re pîroz dikin ve, di doma-
hiya hemûya nifşeyên xwe de, ji
nîjada we her kî, mindariya wî di
ser wî de nêzîk bibe, dê ew can
ji ber min ve bête avêtin; ez XU-
DAN im! 4 Ji nîjada Harûn, kesê
bi cizam an jî bi herikandî, heta
ku paqij bibe, dê ji tiştê pîroz ve
nexwe. Û kesê ku destê xwe li
tiştê ku bi sedema mirî mindar
bûye bixe, an jî zilamê ku avik jê
derketiye; 5 an jî zilamê ku destê
xwe li heywanên ku bi erdê ve
diçin, an jî sedema mindariya wî
her çi be, kesê ku mirovan mindar
dike ve bixe; 6 canê ku destê xwe
bi tiştê wusa xistiye, dê heta êvarî
mindar be û heta ku bedena xwe
bi avê ve neşo, dê ji tiştên pîroz
nexwe. 7 Û dema roj biçe ava dê
paqij bibe û paşî wê dê ji tiştên
pîroz ve bixwe, ji ber ku nanê wî
ye. 8 Dê laşê heywanê ku ji xwe
miriye an jî cenawir wî perçe ki-
riye, bona ku bi wê xwe mindar
neke, nexwe; ez XUDAN im! 9 Û
dê bi emrê min ve bigirin, da ku,
bona wê sûcê li xwe hilnegirin û
ger wê xera bikin, bila nemirin, ez
yê ku wan pîroz kiriye, XUDAN
im.
10 Û tu kesek biyan dê ji tiştê
pîroz ve nexwe, mêvanê kahîn, an
jî yê wî yê bi mişe dê ji tiştê pîroz
ve nexwe. 11 Lê belê canê ku
kahîn bi perê xwe stendiye, dê ji
wê bixwe û yên ku li mala wî ha-
tine dinê, dê ji nanê wî ve bixwin.
12 Û qîza kahîn ya ku bi yekî bi-
yan re zewiciye, dê ji pêşkêşiyên
rakirinê ên tiştên pîroz ve nexwe.
13 Lê belê qîza kahîn ya bî, an jî
hatiye berdan û nîjad jê nebûye û
dîsa vegeriyaye mala bavê xwe,

[1] Yanê hêlik.

dê mîna di ciwantiya xwe de ji
nanê bavê xwe ve bixwe; lê belê
tu kesek biyan dê ji wê ve ne-
xwe. 14 Û zilamek ger bi nezanî
tiştê pîroz bixwe, wê gavê divê ji
pênca yekê bi ser wê bixe û tiştê
pîroz bide kahîn. 15 Û dê tiştên
pîroz ên ku lawên Îsraêl pêşkêşî
XUDAN dikin xera nekin 16 û
bi vî awayî bi xwarina tiştê pîroz,
sûcê gunehê bi ser wan ve dixin;
ji ber ez yê ku wan pîroz kiriye,
XUDAN im.

*Qurbanên ku dê neyên qebûl kirin*
5.Mûs 17,1; Male 1,8.13-14

17 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 18 Bi Harûn re û bi lawên wî re
û ji hemûya lawên Îsraêl re biaxife
û ji wan re bibêje: Ji mala Îsraêlê
ve û ji yên ku li Îsraêlê mêvan in
her kes, dixwaze bila ji hemû qew-
lên wan an jî ji hemû pêşkêşiyên
wanî ji dil ên ku ji XUDAN re
mîna pêşkêşiya şewitandinê pêşkêş
dikin ve bibe, dema pêşkêşiya
xwe pêşkêş dike; 19 ji bo ku hûn
bên qebûl kirin, hûn ê ji ganêran,
ji mîhan, an jî ji bizinan nêriyekî
bêqisûr pêşkêş bikin. 20 Lê belê,
hûn ê yê ku tê de qisûr heye pêşkêş
nekin; ji ber ku dê bona we neyê
qebûl kirin. 21 Û her kî, bona
berdêla qewlekê bide, an jî bona
pêşkêşiya ji dil, ji ganêran, an jî ji
mîhan qurbanê pêşkêşiyên xweşiyê
ji XUDAN re pêşkêş bike, divê
bona ku bête qebûl kirin bêqisûr
be; di wî de qisûr tune be. 22 Divê
hûn yê kor, an jî şikestî, an jî kud,
an jî bi girêk, an jî keçel, an jî ya
bi qalik ji XUDAN re pêşkêş ne-
kin û ji XUDAN re wekî pêşkêşiya
şewitandinê, li ser pêşkêşîgehê ji
wan pêşkêşiyekê pêşkêş nekin.
23 Ganêrê ciwan an jî berxika ku
di endamên wê de zêdeyî an jî kê-
masî heye tu dikarî wekî pêşkêşiya
ji dil pêşkêş bikî; lê belê dê bi qew-
lî neyê qebûl kirin. 24 Hûn ê yê
gunikên[1] wî hatine lêxistin, an jî
eciqandin, an jî badan, an jî hatiye
jêkirin ji XUDAN re pêşkêş nekin
û divê hûn di welatê xwe de wusa
nekin. 25 Û wekî nanê Xwedayê
xwe, tu yên vana divê hûn ji destê
biyanan ve pêşkêş nekin; ji ber ku
xerabiyên wan ji wan in, di wan de
qisûr hene; dê bona we neyên qe-
bûl kirin.

26 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 27 Dema golikek an jî berxi-
kek an jî karikek bizê, dê heft roj
bi dayika xwe re bimîne û wekî
pêşkêşiya ku bi agir ve ji XUDAN
re tête kirin, ji roja heyştemîn pê
ve û di rojên ku li pêy wê dê bête
qebûl kirin. 28 Dixwaze bila çêlek
be, dixwaze jî mîh be, divê hûn
wê û çêlikê wê di rojekê de serjê
mekin. 29 Û dema hûn ji XUDAN
re qurbana şikiryê qurban bikin,

1 Yanê hêlik.

bona ku hûn bên qebûl kirin hûn ê qurban bikin. 30 Dê di eynî rojê de bête xwarin; heta sibeha din divê hûn ji wê nehêlin; ez XUDAN im. 31 Û hûn ê bi emirên min bigirin û wan bikin; ez XUDAN im. 32 Û hûn ê navê minî pîroz xera nekin; ez ê di nava lawên Îsraêl de bêm pîroz kirin; ez XUDANê ku we pîroz kiriye me. 33 Bona ku bibim Xwedayê we, we ji welatê Misirê ve derxistim; ez XUDAN im.

*Cejnên Xudan*

1.Mûs 2,1-3

23 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 2 Bi lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re bibêje: Cejnên XUDAN ên ku hûn ê wekî civakên pîroz bidin bang kirin, cejnên min vana ne.

*Roja Sebtê*

3 Dê şeş roj kar bête kirin; lê belê di roja heftemîn de Sebta bitûmî rehetiyê, civaka pîroz e; hûn ê qet bi tu tewrî kar nekin; di hemû şunwarên we de ji XUDAN re Sebt e.

*Fisih û Cejna Nanê Bêhavên*

2.Mûs 12,2-28

4 Cejnên XUDAN, civakên wî yên pîroz ên ku hûn ê di demên wanî eşkere de bidin bang kirin ev in. 5 Di meha yekemîn de, di roja çardehê ya mehê de ber êvarê, Fisiha XUDAN e. 6 Û di roja panzdehan ya vê mehê de, ji XUDAN re cejna nanê bêhavên e; hûn ê heft roj nanê bêhavên bixwin. 7 Di roja yekemîn de dê civaka we yî pîroz çêbibe; hûn ê qet tu karê giran çênekin. 8 Û heft roj hûn ê ji XUDAN re pêşkêşiya ku bi agir ve tête kirin bikin; di roja heftemîn de civaka pîroz e; hûn ê qet tu karê giran çênekin.

*Zadê Pêşîn*

2.Mûs 23,16-19

9 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 10 Bi lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re bibêje: Dema hûn herin welatê ku dame we û zadê wê biçînin, wê gavê hûn ê demeta nûberê[1] zadên xwe ji kahîn re bînin 11 û ew ê ji bo ku bona we bête qebûl kirin, dê li ber XUDAN demetê bihejîne; dê kahîn wê roja ku paşî Sebtê wê bihejîne. 12 Û di roja ku we demetê hejandin de hûn ê ji XUDAN re wekî pêşkêşiya ku tête şewitandin berxikek nêr yê yek salî pêşkêş bikin. 13 Û pêşkêşiya wê yî nan, pêşkêşiya ku bi agir ve ji XUDAN re tête çêkirin, wekî ku bêhn xweşî be, ji deh pariyê efayê du pariyî arvanê ku bi rûn ve hatiye sitirandin be û pêşkêşiya wê yî rijandinê ji çar

[1] Yekemînê.

parî pariyekê hînekê xemrê be.
14 Û dema hûn pêşkêşiya Xwe-
dayê xwe bînin, bitûmî heta wê
rojê hûn ê nan û genimê hatiye
qemirandin[1] û similê teze ne-
xwin; di tûmiya nifşeyên xwe
de di hemû şunwarên xwe de, dê
bibe zagona abadîn.

*Cejna Çandinê*

5.Mûs 16,9-12

15 Û hûn ê ji xwe re roja ku paşî
Sebtê, ji roja ku we demeta he-
jandinê anîne bijmêrin; dê bitûmî
bibe heft Sebt; 16 heta paşî Seb-
ta heftemîn hûn ê pêncî rojî bij-
mêrin û pêşkêşiya nan ya nû ji
XUDAN re pêşkêş bikin. 17 Hûn
ê ji şunwarên xwe ve, wekî ji deh
pariyê efayê du pariyî, du heb
nanê hejandinê bînin; dê ji arvanê
zirav bin; wekî ku ji XUDAN re
nûber bin dê bi havênê ve bên pi-
jandin. 18 Û tevî nan heft berxi-
kên yek salî û ganêrekî ciwan û
du beranî pêşkêş bikin; vana wekî
ku ji XUDAN re, tevî pêşkêşiyên
şewitandinê, tevî pêşkêşiyên wanî
nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
pêşkêşiya ku bi agir ve tête kirin,
ji XUDAN re bibin bêhn xweşî.
19 Û hûn ê wekî pêşkêşiya
sûcê nêriyekî û wekî qurbana
pêşkêşiyên xweşiyê du heb ber-
xikê nêr ên yek salî pêşkêş bikin.
20 Û dê kahîn wan tevî her du
berxik û nanê nûberan wekî
pêşkêşiya hejandinê li ber XU-
DAN bihejîne; dê bona kahîn ji
XUDAN re pîroz bin. 21 Û hûn
ê bitûmî di wê rojê de bidin bang
kirin; dê ji we re bibe civaka
pîroz; qet hûn ê karekî agir çêne-
kin; di tûmiya nifşeyên we de dê
di hemû şunwarên we de bibe za-
gona abadîn.
22 Û dema we zadê warê xwe çin-
andin, tuyê heta sînorên[2] zeviya
xwe bitûmî neçîne û similên zadên
ku ketine tuyê nede hev; tuyê wan
bona xizan û bona xerîb berde; ez
Xwedayê we, XUDAN im.

*Roja Bîranînê*

4.Mûs 29,1-6

23 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 24 Bi lawên Îsraêl re biaxife
û ji wan re bibêje: Di meha hef-
temîn de, roja yekem ya mehê de,
bona we bitûmî rehet, bi dengê bo-
riyê bîranîn, civaka pîroz dê bibe.
25 Hûn ê qet tu karê giran nekin û
ji XUDAN re, pêşkêşiya ku bi agir
ve têtê çêkirin pêşkêş bikin.

*Roja Lêborandina gunehan*

3.Mûs 16; 4.Mûs 29,7-11

26 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 27 Di wê meha heftemîn de,
tam roja dehemîn, roja kefaretê

1 Qelandin.

2 Quncikên zeviya xwe, an jî: Qeraxên hwd.

ye, dê bona we civaka pîroz bibe
û hûn ê canên xwe nizm bikin û
ji XUDAN re, pêşkêşiya ku bi
agir ve tête kirin pêşkêş bikin.
28 Û tam di wê rojê de hûn ê qet
tu karî nekin; ji ber ku bona we, ji
bo ku hûn li ber Xwedayê xwe XU-
DAN kefaretê bikin, roja kefaretê
ye. 29 Ji ber ku tam di wê rojê de,
canê ku xwe nizm neke, dê ji nete-
wa xwe ve bête avêtin. 30 Û tam
di wê rojê de, ez ê canê ku her ka-
rekî bike, ji nav netewa wî ve tune
bikim. 31 Hûn ê qet tu karî nekin;
di tûmiya nifşeyên we de, dê di
hemû şunwarên we de bibe zagona
abadîn. 32 Dê bona we bibe Sebta
bitûmî rehetiyê û hûn ê canên xwe
nizm bikin; di roja nehemîn ya
mehê de, ber êvarê, ji êvarekî heta
êvara din, hûn ê Sebta xwe bigirin.

*Roja Haymeyan*

4.Mûs 29,12-39; 5.Mûs 16,13-17

33 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 34 Bi lawên Îsraêl re biaxife û
ji wan re bibêje: Di roja panzdehan
ya vê meha heftemîn de, heft roj,
ji XUDAN re cejna haymeyan e.
35 Dê di roja yekemîn de civaka
pîroz bibe; hûn ê qet tu karê giran
nekin. 36 Heft rojî hûn ê ji XUDAN
re pêşkêşiyên ku bi agir ve tên cêki-
rin pêşkêş bikin, di roja heyştemîn
de dê bona we civaka pîroz çêbibe
û hûn ê ji XUDAN re pêşkêşiya ku
di agir de tên çêkirin pêşkêş bikin;
civaka mezin ya cejnê ye; hûn ê qet
tu karê giran nekin.
37 Cejnên XUDAN ên ku hûn ê
wekî civakên pîroz bidin bang
kirin ev in; hûn ê ji XUDAN re
pêşkêşiya ku di agir de tête çêki-
rin, pêşkêşiya ku tête şewitandin
û pêşkêşiya nan, qurbanê û
pêşkêşiyên ku tên şewitandin,
her yekê di rojên wê de pêşkêş
bikin; 38 vana xeynî hemû Seb-
tên XUDAN û xeynî xelatên we
yên ku hûn didin XUDAN û xeynî
hemûyên qewlên we û xeynî hemû
pêşkêşiyên we yên ku ji dil in.
39 Tam di roja panzdehan ya meha
heftemîn de, dema ku we zadê
welat dane hev, hûn ê heft rojan
cejna XUDAN bigirin; di roja
yekemîn de bitûmî rehet û dê di roja
heyştemîn de bitûmî rehet be. 40 Û
di roja yekemîn de, hûn ê bona xwe
mêwa darên xweşik, darên xurme û
guliyên darên pel pihêt û biyên çem
bigirin û hûn ê li ber Xwedayê xwe
XUDAN ve heft rojî şahiyê çêbikin.
41 Û hûn ê wê, wekî ku ji XUDAN
re cejn be di salê de heft rojî bigirin;
dê di tûmiya nifşeyên we de bibe
zagona abadîn; hûn ê di meha hef-
temîn de wê bigirin. 42 Hûn ê heft
roj di haymeyan de rûnin; li Îsraêlê,
dê hemûyên dimatî[1] di haymeyan
de rûnin; 43 da ku, bila nifşeyên
we pê bizanibin ku dema lawên Îs-

[1] Yanê gelê welêt.

raêl ji Misirê ve derxistim, wan di haymeyan de dam rûniştandin; ez Xwedayê we, XUDAN im. 44 Û Mûsa cejnên XUDAN ji lawên Îsraêl re gîhand.

*Rewneqiya di Hizûra Xudan de vêdikeve*

2.Mûs 27,20-21; 4.Mûs 8,1-4

24 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 2 Ji lawên Îsraêl re emir bike ku, her tim bona ku qendîlê vêxin, bona ronahiyê bila rûnê xalis yê zeytûna eciqandî ji te re bînin. 3 Bona ku her tim li ber XUDAN, di Çadira Civandinê de, li derveyî perdeya şehadetê, ji êvarê heta sibê vêkeve dê Harûn wê amade bike, di tûmiya nifşeyên we de, dê bibe zagona abadîn. 4 Her tim li ber XUDAN, dê ji ser şimadankê ya xalis zêrê, qendîlan amade bikin.

*Nanê ku ji Xudan re tête Pêşkêşkirin*

2.Mûs 25,23-30

5 Û tuyê arvanê zirav rahêle û ji wê donzdeh pîde çêbike; di pîdeyekê de yê ji dehê efayekê dudo hebe. 6 Û wan li ber XUDAN, di sifra paqij de, wekî ku di her rêzê de şeş hebe, bi du rêzî tuyê deyne. 7 Bona nan bîranîn, ji bo ji XUDAN re bibe pêşkêşiya ku bi agir ve tête kirin, tuyê buxura safî deyne ser her du rêzî. 8 Dê her roja Sebtê tim wê li ber XUDAN amade bike; peymana abadîn ya ji aliyê lawên Îsraêl e. 9 Û dê bona Harûn û lawên wî be û dê wê li cîhekî pîroz bixwin; ji ber ku bi zagona abadîn ve ji pêşkêşiyên XUDAN ên ku bi agir ve tên çêkirin, bona wî zehf pîroz e.

*Aqûbeta kesê ku naletê li Xwedê kiriye*

4.Mûs 15,32-36

10 Û lawê pîrekek Îsraêlî derket nav lawên Îsraêl û bavê wî Misirî bû û di artêşgehê de lawê pîreka Îsraêlî û zilamekî Îsraêlî şer kirin 11 û lawê pîreka Îsraêlî ji navê XUDAN re kufir kir û naletê kir û wî ji Mûsa re anîn. Û navê dayika wî ji ezbeta Dan, Şelomîta qîza Dibrî bû. 12 Û bona ku emrê XUDAN jê re bête gotin, bi wî girtin[1].

13 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 14 Yê ku naletê bike, derxîne derveyî artêşgehê û hemûyên ku wî bihîstine, bila destên xwe deynin ser serê wî û bila hemûya civakê wî birecimînin. 15 Û tuyê bi lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re bibêje: Her kî ji Xwedayê xwe re naletê bike dê sûcê xwe hilgire. 16 Û yê ku ji navê XUDAN re kufir kiriye muheqeq dê bête kuştin; dê hemûya civakê muheqeq wî birecimînin; dixwaze bila xerîb be,

1 Ew bendî kirin.

an jî dimatî[1] be, dema ji navê XUDAN re kufrê bike, dê bête kuştin. 17 Û ger kesek li zilamekî bixe, dê muheqeq bête kuştin. 18 Û yê ku li heywanekî xistiye, dê li dêvila canê bi can berdêla wê bide! 19 Û ger kesek cîranê xwe seqet bike, mîna ku kiriye dê li wî jî bête kirin; 20 bona ku li dêvila şikestinê, şikestin, li dêvila çav, çav, li dêvila diran jî diran be, her çawa zilam seqet kiribe, dê ji wî re jî bi vî awayî bête kirin. 21 Û yê ku li heywan xistibe, dê berdêla wê bide û yê ku li zilam xistibe, dê bête kuştin. 22 Dê bona we darazî yek be; bona xerîb çawa be, dê bona dimatî jî wusa be; ji ber ku ez Xwedayê we, XUDAN im. 23 Û Mûsa ji lawên Îsraêl re got û yê ku naletê kiriye derxistin derveyî artêşgehê û bi kevir ve wî recimandin. Û lawên Îsraêl mîna ku XUDAN ji Mûsa re emir dayiye kirin.

*Sala Sebtê*

2.Mûs 23,10-11

25 Û XUDAN li Çiyayê Sînayê bi Mûsa re axifî û got: 2 Bi lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re bibêje: Dema hûn bikevin welatê ku dame we, dê welat ji XUDAN re Sebtê bigire. 3 Tuyê sê sal zeviya xwe bajo û şeş sal kezaxtina rezê xwe bike û berê wê bide hev; 4 lê belê di sala heftemîn de dê bona welat Sebta rehetiya bitûmî, ji XUDAN re Sebt be; tuyê zeviya xwe neçîne û kezaxtina rezê xwe neke. 5 Û yê ku li pêy çinîna xwe ya ku ajotiye neçîne û tiriyên mêwa ku kezaxtina wê nehatiye çêkirin nedin hev; dê bona welêt bibe sala rehetiya bitûmî. 6 Û Sebta welêt dê bona te û bona qûlê te û bona cariya te û bona zilamê te yê bi mişe, ê ku li cem te mêvan e û bona xerîbê te bibe xwarin. 7 Û zadê wê dê ji dewarên te re û ji heywanên ku li welatê te ne re bibe xwarin.

*Sala Azadiyê*

3.Mûs 27,17-24

8 Û tuyê bona xwe Sebtên heft salî, heft carî heft salî bijmêre û dê bona te rojên Sebtên heft salî, çel û neh sal bin. 9 Û di meha heftemîn de, di roja dehemîn ya mehê de tuyê boriya deng bilind bigerîne; hûn ê boriyê di roja kefaretê de di hemûya welêt de bigerînin. 10 Û hûn ê sala pênciyem pîroz bikin û li welêt, ji hemûyên ku li wir rûdinin re azadiyê bidin bang kirin; dê bona we bibe yûbîl[2]; ji we her yek, dê vegere milkê xwe û ji we her yek dê vegere eşîra xwe. 11 Û sala pênciyem dê ji we re bibe yûbîl; hûn ê neçînin û ti-

[1] Yanê gelê welêt.

[2] Sala şahî û azadiyê ya ku di pêncî salî de carekî tê.

dikare bona wî fidyê bide, an jî ji
yên wekî dinên eşîra wî, merivekî
wî yî nêzîk dikare fidya wî bide;
an jî ger destê wî bigihêje, dikare
bona xwe fidyê bide. 50 Û dê ji
zilamê ku ew stendiye, ji sala ku
xwe firotiye dikare heta sala yûbîlê
hesabê bibîne û dê berdêla firotina
wî li gor hejmara salan be; dê li
cem wî wekî rojaneyên zilamê
bi mişe be. 51 Ger hîn gellek sal
hebin, dê li gor wan berdêla fidya
xwe ji perê ku hatiye stendin bide.
52 Ger heta sala yûbîlê salên ku
mayîne hindik bin, dê wê gavê bi
wî re hesabê bibîne; berdêla fidyê
dê li gor salên wê şunda bide.
53 Dê li cem wî wekî zilamê bi
mişe ê ku ji salê heta salê tête
girtin be; dê li ber çavê te bi tundî
jê re efendîtiyê neke. 54 Û ger bi
vî awayî fidye neyê dayîn, wê gavê
dê ew bi xwe û tevî wî zarokên wî,
di sala yûbîlê de derkevin. 55 Ji
ber ku lawên Îsraêl qûlên min in;
qûlên min ên ku min wan ji welatê
Misirê derxistiye ne; ez Xwedayê
we, XUDAN im.

*Xelata Dilsoziya ji Xwedê re*

5.Mûs 28,1-14

26 Hûn ê ji xwe re pûtan çê-
nekin û bona xwe pûtê qe-
wartî û kevirên çikandî neçikînin
û bona ku li ber secde bikin, hûn ê
li welatê xwe kevirê bi wêne ava
nekin; ji ber ku ez Xwedayê we,
XUDAN im. 2 Hûn ê bi Sebtên
min bigirin û ji Perestgeha min re
hûrmetê bikin; ez XUDAN im!
3 Ger hûn di zagonên min de
bimeşin û bi emirên min ve bigi-
rin û hûn wan bikin; 4 wê gavê ez
ê baranên we di wextên wan de
bişînim û dê erd berê xwe bide û
dê darên beyarê mêwên xwe bi-
din. 5 Û dê bêndera we bigihêje
dema rez xerakirinê û dê dema
rez xerakirinê bigihêje dema çan-
dinê û heta ku têr bibin, hûn ê
nanê xwe bixwin û li welatê xwe
hûn ê bi ewlekariyê rûnin. 6 Û
ez ê xweşiyê bidim welat û hûn
ê rakevin û dê yê ku we bitirsîne
tune be û ez ê heywanên xerab[1]
ji welêt rakim û dê şûr ji welatê
we ve derbas nebe. 7 Û hûn ê bera
neyarên xwe bidin û dê bi şûr li
ber we bikevin. 8 Û dê ji we pênc
kes, dê bera pêy sed kesî bide û dê
ji we sed kes, bera pêy deh hezar
kesî bidin û dê neyarên we bi şûr
li ber we bikevin. 9 Û ez ê wecê
xwe berbi we ve bizivirînim û ez
ê we bi berdar bikim û we zêde
bikim û ez ê peymana xwe bi we
re bidomînim. 10 Û hûn ê zexîra
ku ji berê ve kom bûye bixwin û
bona ku ji zexîra nû re cîh çêbikin,
hûn ê ya kevin derxînin. 11 Û ez
ê şunwara xwe deynim nav we û
dê canê min ji we nekerihe. 12 Û

1 Hov.

ez ê di nav we de bimeşim û ez ê bibim Xwedayê we û hûn ê bibin netewa min. 13 Ez Xwedayê we, XUDANê ku we ji welatê Misirê ve bona ku hûn ji wan re nebin qûl derxistiye me û bendikên nîrê we şikestandim û we, bi serî bilindiyê dam meşandin.

*Cezaya ji Xwedê ve dûrbûnê*
5.Mûs 28,15-68

14 Lê belê ger hûn min guhdarî nekin û bi hemûyên van emirên min ve nekin 15 û ger bona ku nekirina hemûyên van emirên min û xerakirina peymana min hûn zagonên min red bikin û ger canên we ji daraziyên min ve bikerihin; 16 ez ê jî vêya bi we bikim: Ez ê toqînê, werema ku çavan ditefîne û canê dihincirîne û tayê deynim ser we û hûn ê li cîhê vala tovên xwe biçînin û dê neyarên we wê bixwin. 17 Ez ê wecê xwe li dijî we deynim û hûn ê li ber neyarên xwe ve bên lêxistin; yên ku ji we dikerihin, dê li ser we bibin serwer û çawa kesê ku bera we bidin tunebin, hûn ê birevin. 18 Û ger hûn bi vana jî min guhdarî nekin, wê gavê ez ê heft qatê din we perwerde bikim. 19 Û ez ê xirûra quweta we bişkînim û ez ê ezmanên we bikim mîna hesin û erdê we jî bikim mîna tûncê 20 û dê hêza we li cîhê vala[1] bête serf kirin û dê warê we berê nede û darên erdê dê mêwên xwe nedin. 21 Û ger hûn li dijî min bimeşin û li guhdarî kirina min qayîl nebin, li gor sûcên we, ez ê heft qat asîwê bînim serên we. 22 Û ez ê heywanên hov bişînim nav we û dê we ji zarokên we ve bikin û dê heywanên we bişkînin û hejmara we gellekî kêm bikin û dê rêyên we tenha bimînin.

23 Û ger ji aliyê min hûn bi vana jî îsleh nebin û li dijî min bimeşin; 24 wê gavê ez ê jî li dijî we bimeşim û ez ê jî bona sûcên we heft carî li we bixim. 25 Û ez ê şûrê ku tola peymanê hilde bînim ser we û hûn ê li bajarên xwe ve bicivin û ez ê webayê bişînim ser we û hûn ê bi destê neyaran ve bêne dayîn. 26 Gava piştgiriya we yî nan şikestandim, dê deh pîrek nanên we di firnekê de bipijînin û dê nanê we bi weznê şunda bînin û hûn ê bixwin, lê belê têr nebin.

27 Û ger bi vêya jî hûn min guhdarî nekin û li dijî min bimeşin; 28 wê gavê ez ê bi hêrs li dijî we bimeşim; ez ê jî bona sûcên we, heft qatî we bidim cezakirin. 29 Û hûn ê goştên lawên xwe û goştên qîzên xwe bixwin. 30 Û ez ê cîhên we yî bilind xera bikim û pûtên we yî rojê xera bikim û ez ê laşên we deynim ser laşên pûtên we û dê canê min ji we bikerihe. 31 Û

---
[1] Belesebeb.

ez ê bajarên we wêran bikim û pe-
restgehên we xera bikim û bêhnên
we yî xweş bêhn nekim. 32 Û ez
ê warê xalî berdim û neyarên we,
yên ku lê rûdinin dê ji ber vê yekê
şaş û metal bimînin. 33 Û ez ê we
di nav neteweyan de belav bikim
û li pêy we şûr bikişînim û dê
warê we wêran bibin û bajarên we
xirabe bibin.
34 Û gava hîn hûn li welatê neyarên
xwe bûn, di hemû rojên tenhabûnê[1]
de, wê gavê dê welat tahma Sebtan
bigre; dê wê çaxê welat rehet bike
û tahma Sebtên xwe bigre; 35 di
hemû rojên xwe yî xalîbûnê[2] de,
aramiya ku di Sebtên ku hûn hîn
li wir rûdiniştin nedidît, dê bibîne.
36 Û dema em werin yên ku ji ber
we mayîne, ez ê li welatên neyaran
de tirsê bidim dilên we û dengê
pelê ku ba wê di erdê de kaş dike,
dê bera wan bide û mîna yên ku ji
şûr ve direvin, dê birevin û kesî ku
bera wan dide tunebe jî dê bikevin.
37 Û kesî ku bera wan dide tunebe
jî, dê mîna ku ji ber şûr direvin bi
ser hev ve têk biçin û dê qudreta we
tune be ku hûn li ber neyarên xwe
bisekinin. 38 Û hûn ê di nav nete-
weyan de helaq bibin û dê welatê
neyarên we, we bixwin. 39 Û yên
ku ji ber we mayîne dê di welatên
neyar de di fesadiya xwe de bihin-
cirin û dê di fesadiyên bavên xwe
de tevî wan bihincirin.
40 Û fesadiyên wanî di sûcên wan
ên ku li dijî min kirine û fesadiyên
bavên wan de û ji ber ku li dijî min
meşiyane, 41 dê îqrar bikin[3] ku ez jî
li dijî wan meşiyame û wan anîme
welatê neyarên wan; ger wê çaxê
dilên wanî bêsunet nizm bibe û wê
çaxê bi cezayên fesadiyên xwe razî
bibin; 42 ez ê jî peymana xwe yî bi
Aqûp re di bîra xwe de bînim, him
peymana xwe yî bi Îshaq re, him jî
peymana xwe yî bi Birahîm re di
bîra xwe de bînim û ez ê welêt di
bîra xwe de bînim. 43 Dê welat jî
ji aliyê wan ve bête berdan û dema
ji wan tenha bibe, dê tahma Seb-
tên xwe bigre û dê bi cezaya fesa-
diya xwe ve razî bibin; ji ber ku,
belê, ji ber ku daraziyên min red
kirin û canên wan ji zagonên min
ve kerihîn. 44 Û tevî vêya, dema
li welatên neyaran bin, bona ku
wan bitûmî tune bikim û peymana
min ya ku bi wan re ye bişkînim,
ez ê wan red nekim û ez ê ji wan
nekerihim; ji ber ku ez Xwedayê
wan XUDAN im 45 û bona ku bi-
bim Xwedayê wan, ez ê peymana
bapîrên wan, yên ku ji welatê Mi-
sirê, li ber çavên gelan ve derxisti-
me, di oxra wan de di bîra xwe de
bînim; ez XUDAN im.

1 Xalîbûnê.
2 Tenhabûnê.
3 Bibêjin.

46 Zagon û darazî û şerîetên ku
XUDAN, di navbera xwe û lawên
Îsraêl de li Çiyayê Sînayê bi destê
Mûsa ve danîne, ev in.

*Qaîdeyên di derbarê Qewlên Xwestekan de*

5.Mûs 23,21-23

27 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Bi lawên Îsraêl
re biaxife û ji wan re bibêje: Dema
kesek qewlekê bide, dê can li gor
qîmeta ku te daniye bibin yên
XUDAN. 3 Û qîmeta ku te daniye
dê bona mêran ji bîst salî heta şêst
salî be, qîmeta ku te daniye, li gor
şekela cîhê pîroz, dê pêncî şekel
zîv be. 4 Û ger pîrek be, wê gavê
dê qîmeta ku te daniye sîh şekel
be. 5 Û ger ji pênc salî heta bîst
salî be, wê gavê qîmeta ku te bona
mêr daniye bîst şekel û bona qîzê
deh şekel be. 6 Û ger ji yek mehî
heta pênc salî be, wê gavê qîmeta
ku te bona mêr daniye pênc şekel
û bona qîzê sê şekel be. 7 Û ger di
şêst salî û jê berjortir be, qîmeta
ku te bona mêr daniye dê panz-
deh şekel û bona qîzê deh şekel
be. 8 Lê belê ger qasî qîmeta ku
te dayiyê nikaribe bide, wê gavê
dê li ber kahîn bête sekinandin û
dê kahîn lê qîmetê deyne; li gor
destê yê ku qewil kiriye bigihêje,
dê kahîn qîmetê lê deyne.
9 Û ger qewla kesekî ji heywanên
ku ji XUDAN re wekî pêşkêşiyê
tête pêşkêş kirin be, her tiştê ku
ji wê bide, dê ji XUDAN re pîroz
be. 10 Dê wî neguherîne û ya qenc
bi ya xerab re an jî ya xerab bi ya
qenc re neguherîne; ger heywan
bi heywên re biguhere, him ew
û him jî berdêla wê dê pîroz bin.
11 Û ger ji heywanên mindar ên ku
ji XUDAN re nayên pêşkêşî kirin
be, wê gavê dê heywên li ber kahîn
bisekinîne 12 û dixwaze qenc be,
an jî xerab be dê kahîn qîmetê pê
bide; ya ku kahîn li gor qîmeta ku
te dayiyê, dê wusa bibe. 13 Lê belê
ger bi rastî jî fidya wê bide, wê
gavê dê li gor qîmeta ku te dayiyê
ji pêncan yekî bi ser ve bixe. 14 Û
ger kesek, bona ku ji XUDAN re
pîroz bibe mala[1] xwe pîroz bike,
dixwaze bila qenc be, an jî xerab
be, dê wê gavê kahîn qîmeta wê
bide; kahîn çawa qîmetê lê bike,
dê wusa bibe. 15 Û ger yê ku pîroz
kiriye, fidya mala xwe bide, wê
gavê dê ji pênc pariyê perê ku te lê
qîmet daniye, pariyekê bi ser ve ke
û dê yê wî bibe.
16 Û ger kesek, pariyek ji zevi-
ya ku milkê wî ye ji XUDAN re
pîroz bike, wê gavê dê qîmeta ku
te daniye li gor çandina wê be û
dê ji homerek cehê tovî re pêncî
şekel zîv qîmet bête dayîn. 17 Ger
ji sala yûbîlê dest pê bike û zeviya
xwe pîroz bike, dê li gor qîmeta

---

1 An jî: Xaniyê xwe.

ku te daniye bimîne. 18 Û ger ze-
viya xwe paşî yûbîlê pîroz bike,
wê gavê dê kahîn heta yûbîlê li
gor salên mayîne pere ji wî re bi-
hesibîne û ji qîmeta ku te daniye
bixe[1]. 19 Û ger yê ku zeviya xwe
pîroz kiriye, bi rastî jî fidya wê
bide, wê gavê ji pênc pariyê zîvê
ku te lê birriye pariyekî bi ser wê
ve ke û dê ji wî re bimîne. 20 Û
ger fidya zeviyê nede û ger zevi-
yê ji zilamekî din re firotibe, êdî
fidya wê nayê dayîn; 21 lê belê
dema ku zevî di yûbîlê de derke-
ve, wekî zeviya weqfê dê ji XU-
DAN re pîroz be; dê bibe milkê
kahîn. 22 Û ger ne ji zeviyên ku
milkê wî ye, lê belê zeviyeke
ku stendiye ji XUDAN re pîroz
bike; 23 wê gavê dê kahîn berdê-
la qîmeta ku te lê daniye, heta
sala yûbîlê ji wî re bihesibîne û
qîmeta ku te lê dayiye ji XUDAN
re wekî tiştê pîroz di wê rojê de
bide. 24 Di sala yûbîlê de zevî,
dê vegere xwediyê milkê, zilamê
ku jê hatiye stendin. 25 Û hemû
qîmetên ku tuyê deyne dê li gor
şekelê cîhê pîroz be; dê bîst gera[2],
bibe şekelek.

26 Lê di nav heywanan de yê ku
pêşiyê zayiye, ji ber ku ji bo XU-
DAN yê pêşiyê zayiye yî, dê tu
kes wê pîroz neke; dewar be, mîh
be, ya XUDAN e. 27 Û ger ji hey-
wanên ku mindar be, wê gavê dê
li gor qîmeta ku te daniye, fidya
wê bide û ji pêncan yekî bi ser wê
ve bixe û ger fidya wê nede, wê
gavê dê li gor qîmeta ku te daniye
bête firotan.

28 Lê dixwaze ji mirovan be an
ji heywanan be, an jî ji zeviya ku
milkê wî be, kesê ji hemû tiştên
ku ji wî ne, ji XUDAN re weqif
kiriye, dê neyê firotan û fidya wê
neyê dayîn; her weqf ji XUDAN
re pîroz e. 29 Dê bona kesê ku ji
nav mirovan ve hatiye weqif ki-
rin, fidye neyê dayîn; muheqeq
dê bête kuştin. 30 Û dixwaze bila
tova erdê be, an jî mêwa darê be,
hemû dehekiya erdê yên XUDAN
in; ji XUDAN re pîroz in. 31 Û
ger kesek, dê bona hinekê ji dehe-
kiya xwe fidyê bide, dê ji pêncan
yekî bi ser ve bixe. 32 Û dehekiya
hemû dewar û mîhan, dehekiya
hemûyên ku ji bin ço ve derbas
dibin, dê ji XUDAN re pîroz bin.
33 Dê li qenc û xerabê negere û
wê neguhere û ger muheqeq wê
buguhere, wê gavê ew û berdêla
wê dê pîroz bin; dê fidya wê neyê
dayîn.

34 Emirên ku XUDAN bona
lawên Îsraêl, li Çiyayê Sînayê
dane Mûsa ev in.

---

1 Yanê qîmeta zeviyê hîn jî kêmtir be.

2 Li rasteka menan binêrin.

# 4. MÛSA[1]

*Pêşgotin*

Pirtûka Li Çolê Jimartin, dema gelê Îsraêlê ji Çiyayê Sînayê koçkirine heta gîhaştine sînorên rojhilata erdên Kenanê, bûyêrên ku hatine serê wan dinivîse. Pirtûk, navê xwe, ji jimartina berî ji Çiyayê Sînayê koçkirinê Mûsa kiriye, digire. Mûsa, paşî nifşeyek din, li Moabê, li rojhilata Çemê Urdunê, di nav gelê Îsraêlê de jimartinek din kir. Di navbera van her du jimartinan de, gelê Îsraêlê heta Kadeş-Barnea ya ku li başûrê erdên Kenanê ye pêşve çûn. Çi heye ku ji ber bêbaweriya xwe, ji wir pêşvetir, ber ve welatê ku hatiye wad kirin neçûn. Qasî çel salî geriyan û çûn herema rojhilata Çemê Urdunê.

Pirtûka Li Çolê Jimartin, serpêhatiyên gelê ku tim bi tim dikeve newêrekiyê, ji tengasiyan ditirse û gazincan dike, tîne ziman. Gel her tim li dijî Xwedê û li dijî Mûsayê ku Xwedê mîna serokekê li ser wan wezîfedar kiriye, serîhildan. Ev pirtûk li hemberî bêdilsoziya gel, dilsoziya Xwedê û her tim hêvîşandina wî dûpat dike; her çiqas yekcaran bê sebir bûbe jî nezîrandina Mûsa, ya ji Xwedê û gelê xwe re tîne ziman.

Ev pirtûk, wekî din jî zagonên him li Çiyayê Sînayê û him jî li sînorê Kenanê Xwedê bi navdîtiya Mûsa daye digire naveroka xwe.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-9:14 | Îsraêlî, bona ku ji Çiyayê Sînayê koç bikin xwe ama de dikin |
| a.1:1-4:49 | Jimartina yekem |
| b.5:1-8:26 | Zagon û qaîdeyên cûr be cûr |
| c.9:1-14 | Cejna Fisihê ya duwem |
| 9:15-21:35 | Ji Çiyayê Sînayê ber ve Moabê |
| 22:1-32:42 | Bûyerên ku li Moabê bûne |
| 33:1-49 | Kûrteyiya rêwîtiya ji Misirê heta Moabê |
| 33:50-36:13 | Qaîdeyên ku berî derbasbûna aliyê din ya çemê Urdunê hatine dayîn |

[1] Hejmaran.

*Hêjmartina yekem ya ku li Îsraêlê*
*hatiye çêkirin*

4.Mûs 26,1-56

1 Di du saliya ji Misirê derke-
tina wan de, di roja yekemîn
ya meha duwemîn de XUDAN
li çola Sînayê, di Çadira Civan-
dinê de bi Mûsa re axifî û jê re
got: 2 Hemûya civaka lawên
Îsraêl, li gor eşîrên wan, li gor
malên bapîrên wan, bi hejmara
navên wan, her zilamî cuda bi
cuda bigrin; 3 li Îsraêlê yê ku bîst
salî û jê berjortir her yê ku der-
dikeve cengê, tu û Harûn, hûn ê
wan li gor artêşên wan bijmêrin.
4 Û dê tevî we, ji her nîjadî zi-
lamek hebe; dê her yek serokê
malên bapîrê xwe be. 5 Û navên
zilamên ku dê tevî we bisekinin
ev in: Ji Rûbenê: Elîtsûrê lawê
Şedeûr. 6 Ji Şîmeûnê: Şelûmîelê
lawê Tsurîşadday. 7 Ji Cihûdayê:
Nahşonê lawê Ammînadab.
8 Ji Îssakar: Netanelê lawê Tsûar.
9 Ji Zebûlûnê: Elîabê lawê Helon.
10 Ji lawên Ûsiv – ji Efrayîmê:
Elîşamayê lawê Ammîhûd; ji
Manaşşeyê: Gamalîelê lawê Pe-
datsûr. 11 Ji Benyamînê: Abîdanê
lawê Gîdeonî. 12 Ji Danê: Ahîe-
zerê lawê Ammîşadday. 13 Ji
Aşerê: Pagîelê lawê Okran.
14 Ji Gadê: Elîasafê lawê Deûel.
15 Ji Naftalî: Ahîrayê lawê Enan.
16 Yên ku ji civakê hatine bang
kirin, begên ezbetên bapîrên xwe
vana bûn; serekên hezarên Îs-
raêlê bûn. 17 Û Mûsa û Harûn,
van zilamên ku bi navên xwe
tên nîşan kirin girtin 18 û di
roja yekem ya meha duwemîn
de hemûya civakê civandin û li
gor eşîrên wan, bi hejmara navên
xwe, yên ku bîst salî û jê berjor-
tir in, bi cudayî hatin nivîsandin.
19 XUDAN çawa emir dabe
Mûsa, di çola Sînayê de wan bi
vî awayî jimartin.
20 Û pêşiyên Îsraêlê, lawên Rû-
ben, nifşeyên wê li gor eşîran, li
gor malên bapîran, bîst salî û jê
berjortir her zilamê ku derdikeve
cengê, bi hejmara navên xwe ve
bi cudayî hatin nivîsandin. 21 Ên
ku ji ezbeta Rûbenê ve hatine ji-
martin, çel û şeş hezar û pênc sed
kes bûn.
22 Ji lawên Şîmeûn, ên ku bi
nifşeyên xwe, li gor eşîran, li gor
malên bapîran ji wê hatine jimartin,
bîst salî û jê berjortir her zilamê ku
derdikeve cengê, bi hejmara navên
xwe ve bi cudayî, 23 ên ku ji ezbe-
ta Şîmeûnê ve hatine jimartin, pên-
cî û neh hezar û sê sed kes bûn.
24 Ji lawên Gad, ên ku bi nifşeyên
xwe, li gor eşîrên xwe, li gor
malên bapîrên xwe, bîst salî û jê
berjortir her zilamê ku derdikeve
cengê, bi hejmara navên xwe ve
bi cudayî, 25 ên ku ji ezbeta Gadê
ve hatine jimartin, çel û pênc he-
zar û şeş sed û pêncî kes bûn.

26 Ji lawên Cihûda, ên ku bi
nifşeyên xwe, li gor eşîrên xwe, li
gor malên bapîrên xwe, bîst salî û
jê berjortir her zilamê ku derdike-
ve cengê, bi hejmara navên xwe
ve bi cudayî, 27 ên ku ji ezbeta
Cihûda ve hatine jimartin, heftê û
çar hezar û şeş sed kes bûn.
28 Ji lawên Îssakar, ên ku bi
nifşeyên xwe, li gor eşîrên xwe, li
gor malên bapîrên xwe, bîst salî û
jê berjortir her zilamê ku derdike-
ve cengê, bi hejmara navên xwe
ve bi cudayî, 29 ên ku ji ezbeta
Îssakar ve hatine jimartin, pêncî û
çar hezar û çar sed kes bûn.
30 Ji lawên Zebûlûn, ên ku bi
nifşeyên xwe, li gor eşîrên xwe, li
gor malên bapîrên xwe, bîst salî û
jê berjortir her zilamê ku derdike-
ve cengê, bi hejmara navên xwe
ve bi cudayî, 31 ên ku ji ezbeta
Zebûlûn ve hatine jimartin, pêncî
û heft hezar û çar sed kes bûn.
32 Ji lawên Ûsiv – ji lawên
Efrayîm, ên ku bi nifşeyên xwe,
li gor eşîrên xwe, li gor malên
bapîrên xwe, bîst salî û jê berjortir
her zilamê ku derdikeve cengê, bi
hejmara navên xwe ve bi cudayî,
33 ên ku ji ezbeta Efrayîm ve ha-
tine jimartin, çel hezar û pênc sed
kes bûn. 34 Ji lawên Manaşşe, ên
ku bi nifşeyên xwe, li gor eşîrên
xwe, li gor malên bapîrên xwe,
bîst salî û jê berjortir her zilamê ku
derdikeve cengê, bi hejmara navên
xwe ve bi cudayî, 35 ên ku ji ezbe-
ta Manaşşe ve hatine jimartin, sîh
û du hezar û du sed kes bûn.
36 Ji lawên Benyamîn, ên ku bi
nifşeyên xwe, li gor eşîrên xwe, li
gor malên bapîrên xwe, bîst salî û
jê berjortir her zilamê ku derdike-
ve cengê, bi hejmara navên xwe
ve bi cudayî, 37 ên ku ji ezbeta
Benyamîn ve hatine jimartin, sîh
û pênc hezar û çar sed kes bûn.
38 Ji lawên Dan, ên ku bi nifşeyên
xwe, li gor eşîrên xwe, li gor
malên bapîrên xwe, bîst salî û jê
berjortir her zilamê ku derdikeve
cengê, bi hejmara navên xwe ve
bi cudayî, 39 ên ku ji ezbeta Dan
hatine jimartin, şêst û du hezar û
heft sed kes bûn.
40 Ji lawên Aşer, ên ku bi nifşeyên
xwe, li gor eşîrên xwe, li gor
malên bapîrên xwe, bîst salî û jê
berjortir her zilamê ku derdikeve
cengê, bi hejmara navên xwe ve
bi cudayî, 41 ên ku ji ezbeta Aşer
ve hatine jimartin, çel û yek hezar
û pênc sed kes bûn.
42 Ji lawên Naftalî, ên ku bi
nifşeyên xwe, li gor eşîrên xwe, li
gor malên bapîrên xwe, bîst salî û
jê berjortir her zilamê ku derdike-
ve cengê, bi hejmara navên xwe
ve bi cudayî, 43 ên ku ji ezbeta
Naftalî ve hatine jimartin, pêncî û
sê hezar û çar sed kes bûn.
44 Yên ku hatine jimartin vana ne:
Mûsa û Harûn û donzdeh begên

Îsraêlê wan jimartin, ji vana her
yek ji bona mala bapîrê xwe bûn.
45 Û ji lawên Îsraêl, ên ku li gor
mala bapîrên xwe hatine jimartin,
bîst salî û jê berjortir her zilamê
ku derdikeve cengê, 46 hemûyên
ku hatine jimartin şeş sed û sê he-
zar û pênc sed û pêncî kes bûn.
47 Lê belê di nav wan de Lêwi-
yiyan, li gor ezbetên bapîrên
xwe nehatin jimartin. 48 Ji ber
ku XUDAN bi Mûsa re axifî û
jê re got: 49 Lê tuyê ezbeta Lêwî
nejmêre û hemûya wan di nav
lawên Îsraêl de negire; 50 lê belê
tu Lêwiyiyan deyne ser şunwara
şahdeyiyê û ser hemû taximên wê
û her tiştên aidî wê ne û dê ew
ê şunwarê û hemû taximên wê
bikişînin û dê jê re xizmetê bikin
û li dora şunwarê ve bicîh bibin.
51 Û hema koça şunwarê bibe,
dê Lêwiyî wê daxînin û dema
şunwar dê bi cîh bibe, dê Lêwiyî
wê bicîh bikin û biyanê ku nêzîk
were dê bête kuştin. 52 Û lawên
Îsraêl, her yek di cîhê qonaxa xwe
de û li gor artêşên xwe dê her kes
li cem ala xwe bi cîh bibin. 53 Lê
belê bona ku li ser civaka lawên
Îsraêl ve xezeb nebe, dê Lêwiyî
li dora şunwarê bi cîh bibin û dê
notirvaniya şunwarê şahdeyiyê
Lêwiyiyan bigirin. 54 Lawên Îs-
raêl wusa kirin; li gor her tiştên ku
XUDAN ji Mûsa re emir dayiye,
wusa kirin.

*Rêkûpêkiya bicîhbûna Eşîran*

4.Mûs 10,11-28

2 Û XUDAN bi Mûsa û Harûn re
axifî û got: 2 Lawên Îsraêl, her
yek li cem ala xwe, dê bi nîşanên
mala bapîrên xwe bi cîh bibin;
dê li hemberî Çadira Civandinê
bi dorûber bi cîh bibin. 3 Û yên
ku li aliyê rojhilatê, ber bi cîhê ku
roj hiltê rûdinin, li gor artêşa xwe
dê ji ala qonaxa Cihûda be û dê
serokê Cihûdiyan Nahşonê lawê
Ammînadab be. 4 Û artêşa wê û
yên ku ji wê hatine jimartin heftê
û çar hezar û şeş sed kes bûn. 5 Û
dê yên ku li cem wê qonaxê dey-
nin ezbeta Îssakar bin û dê serokê
lawên Îssakar, Netanelê lawê Tsu-
ar be. 6 Û artêşa wê û yên ku ji wê
hatine jimartin, pêncî û çar hezar
û çar sed kes bûn. 7 Û nîjada Ze-
bûlûn û serokê nîjada Zebûlûn dê
Elîabê lawê Helon be. 8 Û artêşa
wê û yên ku ji wê hatine jimar-
tin, pêncî û heft hezar û çar sed
kes bûn. 9 Ji qonaxa Cihûdayê
hemûyên ku li gor artêşên xwe
hatine jimartin, sed û heyştê û şeş
hezar û çar sed kes bûn. Yên ku
pêşiyê dê koç bikin vana ne.
10 Li aliyê başûr dê li gor artêşên
wê, ala qonaxa Rûben hebe û dê
serokê lawên Rûben Elîtsûrê lawê
Şedeûr be. 11 Û artêşa wê û yên ku
ji wê hatine jimartin, çel û şeş he-
zar û pênc sed kes bûn. 12 Û dê yên
ku li cem wan qonaxê deynin ez-

beta Şîmeûn be û dê serokê lawên
Şîmeûn Şelûmîelê lawê Tsûrîşadday
be. 13 Û artêşa wê û yên ku ji wê
hatine jimartin, pêncî û neh hezar û
sê sed kes bûn. 14 Û ezbeta Gad û
dê serokê lawên Gad Elîasafê lawê
Rêuel be. 15 Û artêşa wê û yên ku
ji wê hatine jimartin, çel û pênc he-
zar û şeş sed û pêncî kes bûn. 16 Ji
qonaxa Rûben, hemûyên ku li gor
artêşên xwe hatine jimartin, sed û
pêncî û yek hezar û çar sed û pên-
cî kes bûn. Û yên ku dê derba du-
wemîn koç bikin vana ne.
17 Wê gavê dê di nav qonaxan de
tevî qonaxa Lêwiyiyan koça Ça-
dira Civandinê jî bibe; li gor alên
xwe wekî ku her zilam li cîhên
xwe bin çawa ku qonax danîne,
dê wusa koç bikin.
18 Li aliyê rojavayê, dê li gor
artêşên wê, ala qonaxa Efrayîm
hebe û dê Elîşamayê lawê Am-
mîhûd bibe serokê lawên Efrayîm.
19 Û artêşa wê û yên ku ji wê ha-
tine jimartin, çel hezar û pênc sed
kes bûn. 20 Û dê ezbeta Manaşşe
li cem wê be û dê serokê lawên
Manaşşe, Gamalîelê lawê Pe-
datsûr be. 21 Û artêşa wê û yên
ku ji wê hatine jimartin, sîh û du
hezar û du sed kes bûn. 22 Û dê
serokê ezbeta Benyamîn û lawên
Benyamîn Abîdanê lawê Gîdeonî
be. 23 Û artêşa wê û yên ku ji wê
hatine jimartin, sîh û pênc hezar
û çar sed kes bûn. 24 Ji qona-
xa Efrayîmê hemûyên ku li gor
artêşên xwe hatine jimartin, sed û
heyşt hezar û sed kes bûn. Û yên
ku derba sêwemîn dê koçê bikin
vana ne.
25 Li aliyê bakur dê li gor artêşên
wê ala qonaxa Dan hebe û dê se-
rokê lawên Dan Ahîezerê lawê
Ammîşadday be. 26 Û artêşa wê û
yên ku ji wê hatine jimartin, şêst û
du hezar û heft sed kes bûn. 27 Û
yên ku li cem wan qonax deynin,
dê lawê Aşer bin û dê Pagîelê lawê
Okran bibe serokê lawên Aşer.
28 Û artêşa wê û yên ku ji wê hati-
ne jimartin, çel û yek hezar û pênc
sed kes bûn. 29 Û ezbeta Naftalî û
dê Ahîrayê lawê Enan bibe serokê
lawên Naftalî. 30 Û artêşa wê û yên
ku ji wê hatine jimartin, pêncî û sê
hezar û çar sed kes bûn. 31 Ji qona-
xa Dan hemûyên ku hatine jimartin
sed û pêncî û heft hezar û şeş sed
kes bûn. Yên ku li gor alên xwe herî
dawiyê dê koç bikin vana ne.
32 Ji lawên Îsraêl yên ku li gor
malên bapîrên xwe hatine jimar-
tin vana ne; ji qonaxan hemûyên
ku li gor artêşên xwe hatine ji-
martin şeş sed û sê hezar û pênc
sed û pêncî kes bûn. 33 Lê belê
Lêwiyî, mîna ku XUDAN emir li
Mûsa kiriye, di nav lawên Îsraêl
de nehatin jimartin. 34 Lawên Îs-
raêl wusa kirin; li gor her tiştên
ku XUDAN ji Mûsa re emir dayi-
ye, bi vî awayî, li gor alên xwe bi

cîh bûn û bi vî awayî her yek li
gor eşîran û malên bapîrên xwe
koç kirin.

*Wezîfeyên Lêwiyiyan*

4.Mûs 18,2-6; 1.Dîr 24,1-19; Îbr 5,4

3 Û di roja ku XUDAN li çiyayê
Sînayê bi Mûsa re diaxifî de,
nîjada Harûn û Mûsa vana ne:
2 Û navên lawên Harûn vana ne:
Nadabê ku pêşiyê hatiye dinê û
Abîhû, Eleazar û Îtamar. 3 Navên
lawên Harûn, ên bona ku kahînti-
yê bikin wan tirxan kirine, navên
kahînên ku hatine mesh kirin vana
ne. 4 Û Nadab û Abîhû dema li
çola Sînayê li ber XUDAN agirê
biyan pêşkêş kirin, li ber XUDAN
mirin û zarokên wan tune bûn û
Eleazar û Îtamar li ber bavê xwe
Harûn kahîntiyê kirin.
5 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û jê
re got: 6 Ezbeta Lêwiyê nêzîk bîne
û bona ku li ber kahîn Harûn, jê
re xizmetê bikin wan bisekinînin.
7 Û bona ku xizmeta şunwarê
bikin, dê li ber Çadira Civandinê,
notirvaniya Harûn û notirvaniya
hemûya civakê bigirin. 8 Û bona
ku xizmeta şunwarê bikin, dê no-
tirvaniya hemûya taximên Çadira
Civandinê û lawên Îsraêl bigirin.
9 Û tuyê Lêwiyiyan bide Harûn û
lawên wî; ew ji nav lawên Îsraêl
bitûmî ji wî re hatine dayîn. 10 Û
tuyê Harûn û lawên wî bi wezî-
fedar bike û bila wezîfa kahîntiyê
bikin[1] û biyanê ku nêzîk were, dê
bête kuştin!
11 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 12 Û a vay, ez di nav lawên
Îsraêl de li dêvila hemûyên pêşiyê
bûyîne, yên ku pêşiyê rehmê veki-
rine, ji nav lawên Îsraêl Lêwiyi-
yan girtim û dê Lêwiyî yên min
bin; 13 ji ber hemûyên ku pêşiyê
bûyîne yên min in; di roja ku li
welatê Misirê de li hemûyên ku
pêşiyê bûyîne xistim, li Îsraêlê
dixwaze mirov be, an jî dixwaze
heywan be, hemûyên ku pêşiyê
bûyîne ji xwe re pîroz kirim; dê ew
bibin yên min; ez XUDAN im.
14 Û XUDAN li çola Sinayê bi
Mûsa re axifî û jê re got: 15 Lawên
Lêwî, li gor malên bapîran, li gor
eşîran bijmêre; tuyê her mêrê yek
mehî û jê berjortir bijmêre. 16 Û
Mûsa, wan li gor gotina XUDAN,
mîna ku jê re hatiye emir kirin ji-
martin. 17 Û bi navên xwe lawên
Lêwî vana ne: Gerşon û Kohat û
Merarî. 18 Û li gor eşîrên wî na-
vên lawên Gerşon vana ne: Lîbnî û
Şîmeî. 19 Û li gor eşîrên wî lawên
Kohat: Amram û Yîtshar, Hebron
û Ûzzîel. 20 Û li gor eşîrên wî
lawên Merarî: Mahlî û Mûşî. Li
gor malên bapîran eşîrên Lêwiyi-
yan vana ne.
21 Eşîra Libniyiyan û eşîra
Şîmeiyiyan ji Gerşonê bûn; eşîrên

1 An jî: Dê bi kahîntiyê xwe ve bigirin.

Gerşoniyan vana ne. 22 Li gor
hejmara hemû mêran yên ku ji
wan hatine jimartin yên yek mehî
û ji wê berjortir, ên ku ji wan ha-
tine jimartin heft hezar û pênc sed
kes bûn. 23 Dê eşîrên Gerşoniyan
li paşî şunwarê ber ve rojavayê bi
cîh bibin[1]. 24 Û dê Elîasafê lawê
Lael bibe serokê malên bapîrên
Gerşoniyan. 25 Û tiştên ku dê
lawên Gerşoniyan li bendê bise-
kinin şunwar û Çadir û rûbera wê
û perda deriyê Çadira Civandinê
26 û asqiyên hewşa di navbera
şunwar û pêşkêşîgehe de û per-
da deriyê hewşê û tayên ku bona
hemûya xizmetên wan in.
27 Û eşîra Amramiyan û eşîra Yîts-
hariyan û eşîra Hebroniyan û eşîra
Ûzzieliyan ji Kohatê bûn; eşîrên
Kohatiyan vana ne. 28 Li gor hej-
mara hemû mêrên ku yek mehî û
ji wê berjortir in, heyşt hezar û şeş
sed kes bûn, notirvaniya cîhê herî
pîroz dikirin[2]. 29 Dê eşîrên lawên
Kohatiyan li aliyê başûrê şunwarê
ve bicîh bibin. 30 Û Elîtsafanê
lawê Ûzzîel bibe serokê mala
bapîrên eşîrên Kohatiyan. 31 Û
tiştên ku ew ê li bendê bin Sindoq
û sifre û şimadank û pêşkêşîgeh û
taximên ku li cîhê pîroz tên bika-
ranîn û perde û her tiştên ku aidî
cîhê pîroz in. 32 Û dê Eleazarê
lawê kahîn Harûn bibe serokê se-
rokên Lêwiyiyan û dê çavdêriyê li
notirvanên cîhê pîroz re bike.
33 Eşîra Mahliyan û eşîra Mûşiyan
ji Merarî ne; eşîrên Merarî vana
ne. 34 Li gor hejmara hemû mêrên
ku yek mehî û ji wê berjortir in
şeş hezar û du sed kes bûn. 35 Û
li gor eşîrên Merarî serokê mala
bapîran Tsûrîelê lawê Abîhaîl bû;
dê li aliyê bakurê şunwarê konê
deynin. 36 Û karê ku dê lawên
Merarî dest pê bikin, çarçoveya
şunwarê û mirdiyaqên wê û navko
û sitûnên wê û hemû taximên wê
û her tiştên wê 37 û sitûnên dor
û berên hewşê û navkoyên wan û
sîng û benên wê ne.
38 Û berbi rojhilatê li ber şunwarê,
ber ve cîhê ku roj dê hilê li ber
Çadira Civandinê, yên ku bona
notirvaniya cîhê pîroz, notirvani-
ya lawên Îsraêl bigirin kon danî-
ne, dê Mûsa û Harûn û lawên wî
bin û biyanê ku nêzîk were, dê
bête kuştin. 39 Û hemûyên Lêwi-
yiyên ku bi emrê XUDAN, Mûsa
û Harûn wan li gor eşîrên wan ji-
martine, mêrê mehekî û jê berjor-
tir hemûyên wan bîst û du hezar
kes bûn.
40 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Hemû mêrên pêşî bûyînê lawên
Îsraêl ên mehekî û jê berjortir
bijmêrin û hejmara navên wan
rahêle. 41 Û bona min, ez XUDAN

---

[1] Konê deynin, an jî: Qonax deynin.

[2] An jî: Digirtin.

bikar anîn, dê bikişînin; dê ew ê hemû karên ku bi wan ve tên kirin bikin. 27 Di hemûya xizmeta lawên Gerşonî de û di hemû barên wan de dê hemûya xizmeta wan bi gotina Harûn û lawên wî ve bibin û hûn ê wan bona parastina hemû barên wan wezîfedar bikin.
28 Di Çadira Civandinê de xizmeta lawên Gerşonî ev e; wezîfa wan, dê di bin destê Îtamarê lawê kahîn Harûn de be.

*Wezîfeyên lawên Merarî*

4.Mûs 3,33-37

29 Dema em werin lawên Merarî, tuyê wan li gor malên bapîrên wan û li gor eşîrên wan bijmêre;
30 tuyê wan sîh salî û jê berjortir heta pêncî salî, her yekê ku bona xizmeta Çadira Civandinê bikin dikevin xizmetê bijmêre. 31 Û di Çadira Civandinê de li gor hemû xizmetên wan wezîfeyên wanî barê ev e: Bi hemû taximên wê û bi hemû xizmetên wê dê çarçofeyên şunwarê û mirdiyaqan û navkoyan 32 û bi dor û berê sitûnên hewşê û navkoyên wan û sîngên wan û tayên wan in û hûn ê haletên ku ew bona kişandina wan wezîfedar in, bi navên wan bijmêrin. 33 Dê di bin destê Îtamarê lawê kahîn Harûn de, li gor hemû xizmetên wanî di Çadira Civandinê de xizmeta eşîrên lawên Merarî ev e.

34 Û Mûsa û Harûn û serekên civakê, lawên Kohatî li gor eşîrên wan û li gor malên bapîrên wan, 35
yên sîh salî û jê berjortir heta pêncî salî her yekê di Çadira Civandinê de bona kar bikin ketine xizmetê jimartin 36 û li gor eşîrên xwe yên ku ji wan hatine jimartin du hezar û heft sed û pêncî kes bûn.
37 Yên ku ji eşîrên Kohatiyan hatine jimartin, hemûyên ku di Çadira Civandinê de xizmetê dikin vana bûn; bi navdîtiya Mûsa, li gor gotina XUDAN, Mûsa û Harûn wan jimartin.
38 Û yên ku ji lawên Gerşon hatine jimartin li gor malên bapîrên xwe û li gor eşîrên xwe, 39 yên sîh salî û jê berjortir heta pêncî salî, hemûyên di Çadira Civandinê de bona kar bikin ketine xizmetê; 40 yên ku li gor eşîrên xwe û li gor malên bapîrên xwe ji wan hatine jimartin du hezar û şeş sed û sîh kes bûn. 41 Yên ku ji eşîrên lawên Gerşon ve hatine jimartin, heçiyên ku di Çadira Civandinê de xizmetê dikin vana bûn; li gor emrê XUDAN, Mûsa û Harûn wan jimartin.
42 Û ji eşîrên lawên Merarî, yên li gor eşîrên xwe û li gor malên bapîrên xwe hatine jimartin,
43 yên sîh salî û jê berjortir heta pêncî salî, hemûyên di Çadira Civandinê de bona kar bikin ketine xizmetê; 44 yên ku li gor eşîrên

xwe ji wan hatine jimartin sê hezar û du sed kes bûn. 45 Yên ku ji eşîrên lawên Merarî ve hatine jimartin vana ne; li gor gotina XUDAN ya bi navdîtiya Mûsa ye, Mûsa û Harûn wan jimartin.

46 Yên ku Mûsa û Harûn û serokên Îsraêlê wan jimartine, ji Lêwiyiyan, hemûyên li gor eşîrên xwe û li gor malên bapîrên xwe hatine jimartin; 47 yên sîh salî û jê berjortir heta pêncî salî, hemûyên di Çadira Civandinê de bona karê xizmetê û di Çadira Civandinê de bona karê bar kirinê[1] bikin ketinê, 48 yên ku ji wan hatine jimartin heyşt hezar û pênc sed û heyştê kes bûn. 49 Li gor emrê XUDAN, her yek li gor xizmeta xwe û li gor barê xwe bi destê Mûsa ve hatin jimartin; wekî ku XUDAN emir daye Mûsa ji aliyê wî ve bi vî awayî hatin jimartin.

*Paqijgirtina Civakê*
3.Mûs 13,45-46

5 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 2 Emir bide lawên Îsraêl, bila her yekê bi cizamî û her yekê herikandina wî heye û her zilamê ku ji ber mirî mindar bûye, ji artêşgehê ve derxînin; 3 dixwaze bila zilam be, an jî pîrek be, hûn ê derxînin, bona artêşgeha xwe ya ku ez di navenda wê de rûdinim mindar nekin, hûn ê wan derxînin derveyî artêşgehê. 4 Û lawên Îsraêl wusa kirin û wan derxistin derveyî artêşgehê; XUDAN çawa ji Mûsa re gotibû lawên Îsraêl wusa kirin.

5 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 6 Ji lawên Îsraêl re bibêje: Ger zilamek an jî pîrekek li dijî XUDAN rabezînê bike[2] û ji hemû sûcên mirovan yekê bike û ger ew can bi sûc bibe; 7 wê gavê dê li sûcê xwe mukur bê û berdêla sûcê xwe bitûmî bide û dê ji pêncan yekê bi ser bixe û bide zilamê ku li hemberî wî bisûc e. 8 Û ger bona berdêla sûcê bide, merivekî nêzîk yê wî zilamî tune be, dê xeynî beranê kefaretê yê ku jê re kefaretê bike, dê berdêla sûcê ku ji XUDAN re tête dayîn jî bibe ya kahîn. 9 Û dê her pêşkêşiya rakirina hemû tiştên pîroz ên ku lawên Îsraêl ji kahîn re pêşkêş dikin jî dê bibe ya kahîn. 10 Û tiştên ku her kes pîroz dikin, dê bibin yên kahîn; ger zilamek tiştekî bide kahîn dê ji wî re be.

11 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 12 Bi lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re bibêje: Ger jina zilamekî çewt be û li dijî wî rabeze 13 û ger zilamek nêzîkî wê bibe û ji çavê zilamê xwe ve bi dizî û nuxumandî bimîne û ger pîrek min-

---

1 Kişandinê.

2 Êrîşê bike.

dar bibe û li dijî wê şahde tune be
û sûc jî neyê girtin 14 û ger çav-
nebarî were zilamê wê û çawa ku
jina wî mindar e, lê dîsa jî çavne-
bariyê lê bike, an jî ger çavnebarî
were zilamê wê û çawa ku jina wî
ne mindar be, lê dîsa jî çavneba-
riyê lê bike, 15 wê gavê dê zilam
pîreka xwe bîne cem kahîn û bona
pîrekê wekî ji deh parî efa[1] arvanê
ceh pariyekî arvan pêşkêşiya wê
bîne; dê rûn bi ser wê ve nerijî-
ne û buxurê daneyne ser wê; ji
ber ku çavnebarî pêşkêşiya nan e,
bîranîna ku fesadiyê di bîr de tîne
pêşkêşiya nan e.
16 Û dê kahîn pîrekê nêzîk bîne
û li ber XUDAN bisekinîne
17 û dê kahîn di feraxa axînî de ava
pîroz rahêle û dê kahîn ji toza ku
li raxêra şunwarê ye, rahêle û bixe
avê. 18 Û dê kahîn pîrekê li ber
XUDAN bisekinîne û serê pîrekê
veke û dê pêşkêşiya nan ya bîrha-
tinê bixe nav lepên wê, çavnebarî
pêşkêşiya nan e û dê ava tahliyê ya
ku naletê tîne di destê kahîn de be.
19 Û dê kahîn sondê bi pîrekê ve
bide dayîn û jê re bibêje: Ger zilam
bi te re raneketibe û ger tu di bin
mahra mêrê xwe de ber ve minda-
riyê ve çewt nebûbe, ji vê ava tahl
ya naletê tîne ve xelas bibe. 20 Lê
belê ger tu di bin mahra zilamê
xwe de çewt bûbe û mindar bibe û
ger xeynî mêrê te zilamekî din bi te
re raketi be – 21 wê gavê dê kahîn
bi sonda naletê bi pîrekê re sondê
bide dayîn û dê kahîn ji pîrekê re
bibêje – XUDAN bi daxistina ke-
maxê te û bi werimandina zikê te
bila XUDAN di navenda netewa te
de bona nalet û sondê te bike fêr
e 22 û ev ava ku naletê tîne bona
ku zikê te biwerimîne û kemaxên
te bixîne, dê bikeve rêviyên te! Û
dê pîrek Amîn, Amîn! bibêje.
23 Û dê kahîn van naletan binivisî-
ne û di nav ava tahliyê de dê paqij
bike 24 û dê ava tahliyê ya ku na-
letê tîne bi pîrekê ve bide vexwa-
rin û dê ava ku naletê tîne bikeve
hundirê wê û dê tahl bibe. 25 Û
dê kahîn nanê tahliyê ya çavneba-
riyê ji destê pîrekê ve rahêle û dê
pêşkêşiya nan li ber XUDAN kil
bike û wê bîne pêşkêşîgehê 26 û
wekî bîranîna wê dê kahîn bi tijeyi-
ya lepan ji nanê pêşkêşîgehê rahêle
û di pêşkêşîgehê de bişewitîne û
paşî wê avê bi pîrekê ve bide ve-
xwarin. 27 Û paşî ku avê pê bide
vexwarin dê wusa bibe ku, ger
mindar be û li dijî zilamê xwe ra-
bezînê kiribe, wê gavê dê ava ku
naletê tîne bikeve hundirê wê û dê
tahl bibe û dê zikê wê biwerime û
kemaxa wê bikeve û dê pîrek di
nav netewa xwe de bibe naletek.
28 Û ger pîrek ne mindar be û ew
paqij be, wê gavê dê xelas bibe û
zarokên wê çê bibin.

1 Li rasteka menan binêrin.

29 Zagona çavnebariyê ev e, ka
kengê pîrekek çewt bibe, di bin
mahra zilamê xwe de mindar bibe,
30 an jî çavnebarî were ser zilamekî
û çavnebariya pîreka xwe bike; wê
gavê dê pîrekê li ber XUDAN bi-
sekinîne û dê kahîn hemûya vê za-
gonê li ser wê çêbike. 31 Û dê zi-
lam ji fesadiyê ve xelas bibe û ew
pîrek dê fesadiya xwe bikişîne.

*Nezîrkiriyê Xwedê*
Serw 13,4-5

6 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û jê re got: 2 Ji lawên Îsraêl
re biaxife û ji wan re bibêje: Ger
zilamek an jî pîrekek bona qewla
xwe yî qurbanê ya ku hatiye qe-
wil kirin, binezirîne xwe ji XU-
DAN re tirxan bike, 3 dê ji xemrê
û ji vexwarinê xwe biparêze; sihi-
ka xemrê û sihika vexwarinê ve-
nexwe û dê qet ava tirî venexwe
û tiriyê teze an jî yê ziwa nexwe.
4 Di hemû rojên xwe yî cudayiyê
de ji dendik heta qalik tu tiştê ku ji
mêw ve tête çêkirin dê nexwe.
5 Di hemû rojên qewla cudayiya
xwe de dê guzan ji ser serê wî ve
derbas nebe; heta rojên ku xwe ji
XUDAN re cuda kiriye tijî bibin,
dê pîroz bibe; porê serê xwe dê ji
dirêj bûnê ve berde.
6 Di hemû rojên ku xwe ji XU-
DAN re cuda kiriye de, dê nêzîkî
miriyan nebe. 7 Dema bavê wî û
diya wî û birayê wî û xwuşka wî
bimirin, dê xwe bona wan mindar
neke; ji ber ku nîşana ji Xwedê re
cuda bûyîn li ser serê wî ye. 8 Di
hemû rojên cudayiya xwe de ji
XUDAN re pîroz e.
9 Û ger zilamek li cem wî nişka
ve bimire û serê cudayiya wî min-
dar bike, wê gavê dê di roja paqi-
jiya xwe de serê xwe kur bike, dê
di roja heftemîn de wê kur bike.
10 Û di roja heyştemîn de, dê du
qumrî an jî du heb çêlikê kevoka
bîne deriyê Çadira Civandinê, ji
kahîn re 11 û kahîn dê yekê wekî
pêşkêşiya sûc û ya din jî wekî
pêşkêşiya şewitandinê pêşkêş
bike û çawa ku ji ber mirî sûc ki-
riye, dê bona wî kefaretê bike û di
wê rojê de dê serê wî pîroz bike.
12 Û dê rojên xwe yî cudayiyê
ji XUDAN re cihê bike û wekî
pêşkêşiya gunehê be, dê berxi-
kekî yek salî bîne, lê belê rojên ku
berê[1] dê bi valahiyê ve derbas bi-
bin, ji ber ku cudayiya wî mindar
bûyiye.
13 Û zagona xwe qewil kirinê ev
e: Dema rojên cudayiya wî biqe-
din, dê wî bînin ber deriyê Çadira
Civandinê 14 û wekî pêşkêşiya
şewitandinê be, dê berxikek nêr
yê bê qisûr û yek salî û wekî
pêşkêşiya sûcê be, dê berxikek
mê ya bê qisûr û yek salî û wekî
bibe pêşkêşiyên xweşiyê, dê be-

[1] An jî: Çûyîne.

ranek bêqisûr 15 û sepetek nanê
bê havên, pîdeyên arvan ên zirav
yên ku bi rûn ve hatine sitirandin
û nanê sêlê yên bê havên ku rûn di
wan de hatine dayîn û pêşkêşiya
wanî nan û wekî pêşkêşiyên wanî
rijandinê be, dê pêşkêşiya xwe ji
XUDAN re pêşkêş bike.
16 Û dê kahîn li ber XUDAN wan
pêşkêş bike û dê pêşkêşiya wî yî
sûcê û pêşkêşiya wî yî şewitandinê
pêşkêş bike 17 û tevî sepeta nanê
bê havên dê beran ji XUDAN re
wekî qurbanê pêşkêşiyên xweşiyê
pêşkêş bike; dê kahîn pêşkêşiya wî
yî nan û pêşkêşiya wî yî rijandinê
jî pêşkêş bike. 18 Û yê xwe qewil
kiriye dê di deriyê Çadira Civan-
dinê de serê cudayiya xwe kur bike
û porê serê cudayiya xwe rahêle û
deyne ser agirê ku di bin qurbanên
pêşkêşiyên xweşiyê de ne. 19 Û dê
kahîn ji beran ve hêtekî keliyayî û
ji sepetê pîdeyekî bêhavên û na-
nekî sêlê yê bêhavên rahêle û paşî
ku serê cudayiya wî kur kir, dey-
ne ser lepên yê xwe qewil kiriye
20 û kahîn wekî pêşkêşiya kilki-
rinê bin, wan li ber XUDAN kil
bike û ev, tevî parxana kilkirinê û
hêta rakirinê bona kahîn pîroz in
û paşî wê yê xwe qewil kiriye, dê
bikaribe xemrê vexwe.
21 Yê xwe qewil kiriye, yê qewlê
dayiye û xeynî tiştên ku destên wî
digihêjin, bona cudayiya wî zago-
na pêşkêşiya wî ya ji XUDAN re
ev e; li gor qewla ku qewil kiriye,
li gor zagona cudayiya wî divê
wusa bike.

*Pîrozkirina ku dê Kahîn bike*

2.Kor 13,13

22 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 23 Bi Harûn û lawên wî ve
biaxife û bibêje: Hûn ê bi vî awayî
lawên Îsraêl pîroz bikin; hûn ê ji
wan re bibêjin:
24 Bila XUDAN te pîroz bike û
te biparêze!
25 Bila XUDAN wecê xwe ji te re
bibiriqîne û qenciyê[1] ji te re bike!
26 Bila XUDAN wecê xwe ji te
re bilind bike û xweşiyê bide te!
27 Dê bi vî awayî navê min dey-
nin ser lawên Îsraêl û ez ê wan
pîroz bikim.

*Diyariyên ku Serok didin Xudan*

1.Dîr 29,6

7 Û wusa bû ku, dema Mûsa
ava kirina şunwarê qedand
û di roja ku wê û hemû taximên
wê û pêşkêşîgeha wê û hemû ta-
ximên wê mesh û pîroz kirin, di
dema ku wan mesh û pîroz kiri-
ne de, 2 begên Îsraêlê, serokên
malên bapîran, pêşkêşiyan anîn.
Vana serokên ezbetan û ji yên
ku hatine jimartin lênêriyê ki-
rine bûn; 3 bona her du began
erebeyek û wekî bona her yekî

1 Lutif, an jî: Kerem.

gayek be, wekî şeş erebeyên gir-
tî û donzdeh ga bin, pêşkêşiyên
xwe anîn cem XUDAN û wan
li ber pêşkêşîgehê pêşkêş kirin.
4 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 5 Ji wan bistîne, bila di kiri-
na xizmeta Çadira Civandinê de
bête xebitandin û tuyê wan bide
Lêwiyiyan, li gor xizmeta her zi-
lamî bide. 6 Û Mûsa erebe û ga-
yan rahişt û wan da Lêwiyiyan.
7 Du heb erebe û çar heb ga li gor
xizmetên wan da lawên Gerşon
8 û li gor xizmetên lawên Merarî
ya ku di bin destê Îtamarê lawê
kahîn Harûn de kirine, çar ere-
be û heyşt heb ga da wan. 9 Lê
belê neda lawên Kohat, ji ber ku
xizmeta cîhê pîroz li ser wan bû;
wê li ser milên xwe dikişandin.
10 Û di roja ku pêşkêşîgeh hate
mesh kirin de bona tirxan kiri-
na wê, began pêşkêşiyan pêşkêş
kirin û serokan pêşkêşiyên xwe
anîn ber pêşkêşîgehê. 11 Û XU-
DAN ji Mûsa re got: Bona tirxa-
na pêşkêşîgehê, pêşkêşiyên xwe,
wekî ku her beg di roja xwe de
pêşkêş bikin.

12 Û di roja yekemîn de, yê ku
pêşkêşiya xwe pêşkêş kir, Nahşonê
lawê Ammînadabê ji ezbeta Cihû-
da bû 13 û pêşkêşiya wî ev bû: Li
gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek zîv
ya di giraniya sed û sîh şekelî de,
tasek zîv ya heftê şekelî; vana her
duyan jî wekî pêşkêşiya nan be, bi
arvanê zirav ya ku bi rûn ve hatibû
sitirandin tijî bûn; 14 kevçiyek
zêrîn ya deh şekelî û bi buxurê ve
tijî; 15 ganêrekî ciwan, beranek,
berxikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 16 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 17 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikê nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Nahşonê lawê
Ammînadab ev bû.

18 Di roja duwemîn de Netanelê
lawê Tsûarê begê Îsşakar pêşkêş
kir; 19 yê ku wekî pêşkêşiyê xwe
pêşkêş kiriye ev bû: Li gor şekelê
cîhê pîroz, sênîkek zîv ya di gira-
niya sed û sîh şekelî de, tasek zîv
ya heftê şekelî; vana her duyan jî
wekî pêşkêşiya nan be, bi arvanê
zirav ya ku bi rûn ve hatibû siti-
randin tijî bûn; 20 kevçiyek zêrîn
ya deh şekelî û bi buxurê ve tijî;
21 ganêrekî ciwan, beranek, ber-
xikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 22 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 23 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Netanelê lawê
Tsûar ev bû.

24 Di roja sêwemîn de Elîabê
lawê Helonê begê lawên Zebûlûn
pêşkêş kir; 25 pêşkêşiya wî ev bû:
Li gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek
zîv ya di giraniya sed û sîh şekelî

de, tasek zîv ya heftê şekelî; vana
her duyan jî wekî pêşkêşiya nan
be, bi arvanê zirav ya ku bi rûn ve
hatibû sitirandin tijî bûn; 26 kevçi-
yek zêrîn ya deh şekelî û bi buxurê
ve tijî; 27 ganêrekî ciwan, beranek,
berxikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 28 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 29 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Elîabê lawê
Helon ev bû.
30 Di roja çaremîn de Elîtsûrê
lawê Şedeûrê begê lawên Rûben
pêşkêş kir; 31 pêşkêşiya wî ev bû:
Li gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek
zîv ya di giraniya sed û sîh şekelî
de, tasek zîv ya heftê şekelî;
vana her duyan jî wekî pêşkêşiya
nan be, bi arvanê zirav ya ku bi
rûn ve hatibû sitirandin tijî bûn;
32 kevçiyek zêrîn ya deh şekelî û bi
buxurê ve tijî; 33 ganêrekî ciwan,
beranek, berxikek nêr yê yek salî,
yên bona pêşkêşiya şewitandinê;
34 wekî pêşkêşiya sûcê nêriyek
35 û wekî qurbana pêşkêşiyên
xweşiyê be, du ga, pênc heb be-
ran, pênc heb nêrî, pênc heb ber-
xikên nêr, yên yek salî. Pêşkêşiya
Elîtsûrê lawê Şedeûr ev bû.
36 Di roja Pêncemîn de Şelûmîelê
lawê Tsûrîşaddayê begê lawên
Şîmeûn pêşkêş kir; 37 pêşkêşiya
wî ev bû: Li gor şekelê cîhê
pîroz, sênîkek zîv ya di giraniya
sed û sîh şekelî de, tasek zîv ya
heftê şekelî; vana her duyan jî
wekî pêşkêşiya nan be, bi arvanê
zirav ya ku bi rûn ve hatibû siti-
randin tijî bûn; 38 kevçiyek zêrîn
ya deh şekelî û bi buxurê ve tijî;
39 ganêrekî ciwan, beranek, ber-
xikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 40 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 41 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Şelûmîelê
lawê Tsûrîşadday ev bû.
42 Di roja şeşemîn de Elîasafê
lawê Deûelê begê lawên Gad
pêşkêş kir; 43 pêşkêşiya wî ev bû:
Li gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek
zîv ya di giraniya sed û sîh şekelî
de, tasek zîv ya heftê şekelî; vana
her duyan jî wekî pêşkêşiya nan
be, bi arvanê zirav ya ku bi rûn ve
hatibû sitirandin tijî bûn; 44 kevçi-
yek zêrîn ya deh şekelî û bi buxurê
ve tijî; 45 ganêrekî ciwan, beranek,
berxikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 46 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 47 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Elîasafê lawê
Deûel ev bû.
48 Di roja heftemîn de Elîşamayê
lawê Ammîhûdê begê lawên

Efrayîm pêşkêş kir; 49 pêşkêşiya
wî ev bû: Li gor şekelê cîhê pîroz,
sênîkek zîv ya di giraniya sed û
sîh şekelî de, tasek zîv ya heftê
şekelî; vana her duyan jî wekî
pêşkêşiya nan be, bi arvanê zi-
rav ya ku bi rûn ve hatibû siti-
randin tijî bûn; 50 kevçiyek zêrîn
ya deh şekelî û bi buxurê ve tijî;
51 ganêrekî ciwan, beranek, ber-
xikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 52 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 53 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Elîşamayê
lawê Ammîhûd ev bû.
54 Di roja heyştemîn de Gamalîelê
lawê Pedatsûrê begê lawên Manaşşe
pêşkêş kir; 55 pêşkêşiya wî ev bû:
Li gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek
zîv ya di giraniya sed û sîh şekelî
de, tasek zîv ya heftê şekelî; vana
her duyan jî wekî pêşkêşiya nan be,
bi arvanê zirav ya ku bi rûn ve ha-
tibû sitirandin tijî bûn; 56 kevçiyek
zêrîn ya deh şekelî û bi buxurê ve
tijî; 57 ganêrekî ciwan, beranek,
berxikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 58 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 59 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be, du
ga, pênc heb beran, pênc heb nêrî
û pênc heb berxikên nêr, yên yek
salî. Pêşkêşiya Gamalîelê lawê Pe-
datsûr ev bû.

60 Di roja nehemîn de Abîdanê
lawê Gîdeoniyê begê lawên Ben-
yamîn pêşkêş kir; 61 pêşkêşiya
wî ev bû: Li gor şekelê cîhê
pîroz, sênîkek zîv ya di giraniya
sed û sîh şekelî de, tasek zîv ya
heftê şekelî; vana her duyan jî
wekî pêşkêşiya nan be, bi arvanê
zirav ya ku bi rûn ve hatibû siti-
randin tijî bûn; 62 kevçiyek zêrîn
ya deh şekelî û bi buxurê ve tijî;
63 ganêrekî ciwan, beranek, ber-
xikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 64 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 65 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Abîdanê lawê
Gîdeonî ev bû.
66 Di roja dehemîn de Ahîezerê
lawê Ammîşaddayê begê lawên
Dan pêşkêş kir; 67 pêşkêşiya wî
ev bû: Li gor şekelê cîhê pîroz,
sênîkek zîv ya di giraniya sed û
sîh şekelî de, tasek zîv ya heftê
şekelî; vana her duyan jî wekî
pêşkêşiya nan be, bi arvanê zi-
rav ya ku bi rûn ve hatibû siti-
randin tijî bûn; 68 kevçiyek zêrîn
ya deh şekelî û bi buxurê ve tijî;
69 ganêrekî ciwan, beranek, ber-
xikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 70 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 71 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb

nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Ahîezerê lawê
Ammîşadday ev bû.
72 Di roja yanzdehan de Pagîelê
lawê Okranê begê lawên Aşer
pêşkêş kir; 73 pêşkêşiya wî ev bû:
Li gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek
zîv ya di giraniya sed û sîh şekelî
de, tasek zîv ya heftê şekelî; vana
her duyan jî wekî pêşkêşiya nan
be, bi arvanê zirav ya ku bi rûn
ve hatibû sitirandin tijî bûn;
74 kevçiyek zêrîn ya deh şekelî
û bi buxurê ve tijî; 75 ganêrekî
ciwan, beranek, berxikek nêr
yê yek salî, yên bona pêşkêşiya
şewitandinê; 76 wekî pêşkêşiya
sûcê nêriyek 77 û wekî qurba-
na pêşkêşiyên xweşiyê be, du
ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Pagîelê lawê
Okran ev bû.
78 Di roja donzdehan de Ahîrayê
lawê Enonê begê lawên Naftalî
pêşkêş kir; 79 pêşkêşiya wî ev bû:
Li gor şekelê cîhê pîroz, sênîkek
zîv ya di giraniya sed û sîh şekelî
de, tasek zîv ya heftê şekelî; vana
her duyan jî wekî pêşkêşiya nan
be, bi arvanê zirav ya ku bi rûn ve
hatibû sitirandin tijî bûn; 80 kevçi-
yek zêrîn ya deh şekelî û bi buxurê
ve tijî; 81 ganêrekî ciwan, beranek,
berxikek nêr yê yek salî, yên bona
pêşkêşiya şewitandinê; 82 wekî
pêşkêşiya sûcê nêriyek 83 û wekî
qurbana pêşkêşiyên xweşiyê be,
du ga, pênc heb beran, pênc heb
nêrî, pênc heb berxikên nêr, yên
yek salî. Pêşkêşiya Ahîrayê lawê
Enon ev bû.
84 Di roja ku pêşkêşîgeh hate
mesh kirin de, ji aliyê begên Îs-
raêlê ve xelatên wê yî tirxanê
vana bûn: Donzdeh sêniyên zîv,
donzdeh tasên zîv, donzdeh kev-
çiyên zêr; 85 giraniya her sêniya
zîv sed û sîh şekel û ya her tasî
heftê şekel; hemû zîva feraxan,
li gor şekelê cîhê pîroz du hezar
û çar sed şekel bûn; 86 donzdeh
kevçiyên zêrîn, yên bi buxurê ve
tijî ne; li gor şekelê cîhê pîroz
giraniya her kevçiyî deh şekel,
hemû zêrên kevçiyan sed û bîst
şekel bûn; 87 wekî pêşkêşiyên
şewitandinê be, hemûyên heywa-
nan donzdeh ganêrê ciwan, donz-
deh beran; donzdeh berxikên nêr
yên yek salî û pêşkêşiya wanî nan
û wekî pêşkêşiya sûcê bin donz-
deh nêrî 88 û wekî pêşkêşiyên
xweşiyê bin hemû heywanan, bîst
û çar ga, şêst beran, şêst nêrî, şêst
berxikên nêr yên yeksalî. Paşî ku
pêşkêşîgeh hate mesh kirin, xe-
latên wê yî tirxanê ev bûn.
89 Û dema Mûsa bona ku pê re
hevpeyvînê bike kete Çadira Ci-
vandinê, ji ser kefaretgeha ku
li ser Sindoqa Şahdeyiyê yî, ji
nav du kerûbiyan Dengê ku jê re
dibêje dibihîst û jê re digot.

*Qaîdeyên di derbarê Qendîlgehê de*
2.Mûs 25,31-40

8 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 2 Bi Harûn re biaxife û jê
re bibêje: Dema tu qendîlan dey-
ne cîhên wan, dê heft qendîl ro-
nahiyê bidin ber şimadankê. 3 Û
Harûn wusa kir; mîna ku XUDAN
ji Mûsa re emir kiribû, qendîlên
wê wekî ku ronahiyê bide pêşiya
şimadankê bicîh kirin. 4 Û karkeri-
ya şimadankê ev bû; karê kutanvan
zêr bû; şimadankê, mîna mînaka ku
XUDAN nîşanî Mûsa daye çêkir.

*Nezîrkirina Lêwiyiyan*
3.Mûs 8

5 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 6 Ji nav lawên Îsraêl Lêwi-
yiyan rahêje û wan paqij bike.
7 Û tuyê bona ku wan paqij bike,
wusa bike: Ava paqijiyê bi ser
wan ve bireşîne û bila gûzanê ji
ser hemûya bedena xwe ve der-
bas bikin û bila kincên xwe bişon
û xwe paqij bikin. 8 Wê gavê bila
ganêrekî ciwan û wekî pêşkêşiya
wê yî nan be, bila arvanê zirav ya
bi rûn ve hatiye sitirandin rahêlin
û wekî pêşkêşiya sûcê be, tuyê
ganêrekî ciwanî din rahêle. 9 Û
tuyê Lêwiyiyan li ber Çadira Ci-
vandinê pêşkêş bike û tuyê hemû
civaka lawên Îsraêl bicivîne
10 û tuyê Lêwiyiyan li ber XU-
DAN pêşkêş bike. Û dê lawên
Îsraêl destên xwe deynin ser
Lêwiyiyan 11 û bona ku xizme-
ta XUDAN bikin bila bibe karê
Lêwiyiyan, dê Harûn wan li ber
XUDAN ji aliyê lawên Îsraêl ve
wekî pêşkêşiya kil kirinê pêşkêş
bike. 12 Û dê Lêwiyî destên xwe
deynin ser serê ganêran û ji bo ji
Lêwiyiyan re kefaretê bike, dê
yekî wekî pêşkêşiya sûcê be û ya
din jî wekî pêşkêşiya şewitandinê
be, tuyê ji XUDAN re pêşkêş
bike. 13 Û tuyê Lêwiyiyan li ber
Harûn û li ber lawên wî ve bi-
sekinîne û tuyê wan ji XUDAN
re, wekî pêşkêşiya kil kirinê bin,
pêşkêş bike.
14 Û tuyê bi vî awayî Lêwiyiyan ji
nav lawên Îsraêl ve veqetîne û dê
Lêwiyî bibin yên min. 15 Û paşî
wê, dê Lêwiyî bona kirina xizmeta
Çadira Civandinê bikevin hundir
û tuyê wan paqij bike û tuyê wan
wekî pêşkêşiya kil kirinê pêşkêş
bike. 16 Ji ber ku ji nav lawên Îs-
raêl ve, ew bitûmî ji min re hatine
dayîn; li dêvila hemûyên ku reh-
mê vekirine, li dêvila pêşîbûyiyên
lawên Îsraêl, wan ji xwe re girtim.
17 Ji ber ku di nav lawên Îsraêl de
dixwaze mirov be, dixwaze hey-
wan be, hemûyên ku pêşiyê bûyî-
ne yên min in; li welatê Misirê, di
roja ku li yên pêşiyê bûyîne xisti-
me de, wan ji xwe re pîroz kirim.
18 Û di nav lawên Îsraêl de, li
dêvila hemûyên ku pêşiyê bûyî-
ne Lêwiyiyan girtim. 19 Û dema

lawên Îsraêl nêzîkî cîhê pîroz bi-
bin, bona ku di nav lawên Îsraêl
de nebe asîw, di Çadira Civandinê
de bona kirina xizmeta lawên Îs-
raêl û bona ji bo lawên Îsraêl ke-
faretê bike, ji nav lawên Îsraêl ve
Lêwiyiyan bi xelatî dame Harûn
û lawên wî.
20 Mûsa û Harûn û hemû civaka
lawên Îsraêl bi vî awayî ji Lêwi-
yiyan re kirin; lawên Îsraêl li gor
her tiştên ku XUDAN di derheqê
Lêwiyiyan de emir dabû Mûsa,
ji wan re bi vî awayî kirin. 21 Û
Lêwiyiyan xwe ji sûcê paqij kirin
û kincên xwe şuştin û Harûn wan
li ber XUDAN, wekî pêşkêşiya
kil kirinê bin, pêşkêş kir û Harûn
ji bo wan paqij bike bona wan
kefaretê kir. 22 Û paşî wê Lêwi-
yiyan, li ber Harûn û lawên wî
bona ku di Çadira Civandinê de
xizmeta xwe bikin ketin hundir;
mîna ku di derheqê Lêwiyiyan de
XUDAN emir daye Mûsa, ji wan
re wusa kirin.
23 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 24 Qaîdeya di derheqê Lêwi-
yiyan de ev e[1]: Bona ku di Çadira
Civandinê de li benda notirvaniya
xizmetê bin, yên ku ji bîst û pênc
salî û jê berjortir in bikevin hundir
25 û paşî pêncî salî dê ji notirva-
niya xizmetê vekişin û dê êdî xiz-
metê nekin, 26 lê belê dê di kirina
wezîfeyên Çadira Civandinê de
alîkariyê ji birayên xwe re bikin,
lê belê dê xizmetê nekin. Dê di
wezîfeyên xwe de ji Lêwiyiyan re
wusa bikin.

*Qaîdeyên di derbarê Qurbanê Fisihê de*
2.Mûs 12,1-11

9 Û paşî ku ji welatê Misirê der-
ketin di sala duwemîn, meha
yekem de, XUDAN li çola Sî-
nayê bi Mûsa re axifî û got: 2 Bila
lawên Îsraêl di dema eşkere de bi
fisihê bigirin. 3 Di roja çardeha
vê mehê de, ber êvarê, di dema
eşkere de hûn ê bigirin û hûn ê li
gor hemû zagonên wê û darazi-
yên wê ve bigirin. 4 Û Mûsa bona
ku bi Fisihê bigirin ji lawên Îsraêl
re got. 5 Û di çola Sînayê de, di
meha yekemîn de, di roja çardeha
mehê de ber êvarê bi Fisihê gir-
tin; li gor her tiştên ku XUDAN
emir daye Mûsa, lawên Îsraêl
wusa kirin. 6 Û zilamên ku ji ber
miriyê mirov, zilamên mindar
hebûn û di wê rojê de bi Fisihê
negirtin û di wê rojê de hatin ber
Mûsa û Harûn 7 û wan zilaman
ji wî re gotin: Ji ber miriyê mi-
rov em mindar in; ma çima di nav
lawên Îsraêl de, di dema eşkere
de pêşkêşîkirina pêşkêşiya XU-
DAN ji me re tête qedexe kirin?
8 Û Mûsa ji wan re got: Bise-
kinin, ka bona we dê XUDAN çi
emir bide ez bibihîzim.

1 An jî: Tiştê ku aidî Lêwiyiyan ev e.

9 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 10 Bi lawên Îsraêl re biaxife
û ji wan re bibêje: Yekî ji we an jî
ji nîjada we ger ji ber mirî mindar
bibe, an jî di rêwîtiya dûr de be, dê
dîsa ji XUDAN re Fisihê bigire.
11 Dê di çardeha roja meha duwem
de ber êvarî bigirin; dê bi nanê bê
havên û gîhayên tahl ve wê bixwin;
12 dê ji wê heta sibehê nehêlin û
hestiyekî wê neşikînin; li gor hemû
zagona Fisihê bi wê bigirin. 13 Lê
belê ger zilamê paqij û yê ku ne di
rêwîtiyê de ye, ji kirina Fisihê de
şunda bimîne, dê ew can ji netewa
xwe ve bête avêtin; madem ku di
dema eşkere de pêşkêşiya XU-
DAN pêşkêş nekiriye, dê ew zilam
sûcê xwe hilgire. 14 Û ger yekî bi-
yan li cem we mêvan be û Fisihê
ji XUDAN re bigire, li gor ûsil û
zagona Fisihê dê wê bi vî awayî
bigire; him bona we û him bona
mêvan û him jî bona gelê welêt, dê
zagonek we hebe.

*Ewrê li ser Xanî*

2.Mûs 40,34-38

15 Û ji roja ku şunwar hatibû da-
mezirandin, ewr şunwarê, Çadi-
ra Şahdeyiyê nuxumand û êvarî
mîna xuyaniya agirekî heta sibehê
li ser şunwarê bû. 16 Her tim wusa
bû; ewr û êvarî xuyaniya agir wê
dunuxumandin. 17 Û dema ewr ji
ser Çadirê ve dihat rakirin, lawên
Îsraêl koç dikirin û ewr li ku derê
bisekiniya, lawên Îsraêl li wir konê
dadihiştin. 18 Lawên Îsraêl li gor
emrê XUDAN koç dikirin û li gor
emrê XUDAN koçê dadihiştin; di
hemû rojên ku ewr li ser şunwarê
ve disekinî konê datanîn. 19 Û
dema ewr pirr rojan li ser şunwarê
ve dima, lawên Îsraêl notirvaniya
XUDAN ve digirtin û koç nediki-
rin. 20 Û yek caran ewr çend roj li
ser şunwarê ve disekinî; wê gavê
li gor emrê XUDAN konê datanîn
û li gor emrê XUDAN koç dikirin.
21 Û carna ewr ji êvarî heta sibehê
disekinî û dema sibehê ewr dihat
rakirin koç dikirin; an jî rojek û
şevekê, dema ewr dihat rakirin koç
dikirin. 22 Dixwaze bila du roj be,
an jî mehek, an jî gellek roj bin;
her ku ewr li ser sunwarê disekinî
û dêmanî dibû, Lawên Îsraêl qonax
verdigirtin û koç nedikirin; lê belê
dema dihate radikirin, koç dikirin.
23 Li gor emrê XUDAN konê da-
tanîn û li gor emrê XUDAN koç
dikirin; li gor emrê XUDAN ya bi
navdîtiya Mûsa ye, bi notirvaniya
XUDAN ve digirtin.

*Borîjenên Zîv*

10 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Ji xwe re du bo-
riyên zîv çêbike; tuyê wan wekî
karê kutanvan çêbike û tuyê wan
bona bang kirina civakê û koç ki-
rina artêşê bi kar bîne. 3 Û dema
ew hatin lêxistin hemû civak dê li

cem te, li deriyê Çadira Civandinê
de bicivin. 4 Û ger tenê li yekê
bête lêxistin, wê gavê dê began,
serekên hezarên Îsraêlê li cem te
bicivin. 5 Û dema hûn bi dengê bi-
lind lêbixin, artêşên li aliyê rojhilat
kon danîne dê koç bikin. 6 Û cara
duwem dema hûn bi dengê bilind
lêbixin, artêşên ku li aliyê başûr
kon danîne dê koç bikin; bona ku
koç bikin dê bi dengekî bilind bête
lêxistin. 7 Û bona ku civatê bici-
vînin hûn ê di wextê wê de lêxinin,
lê belê divê hûn bi dengê bilind lê-
nexin. 8 Û dê lawên Harûn, kahîn
li boriya bixin û dê ev ê bona we,
di tûmiya nifşeyên we de bibe
zagona abadîn. 9 Û dema hûn li
dijî neyarê ku tengasiyê dide we,
di welatê xwe de derkevin cengê,
hûn ê bi dengê bilind li boriyê bi-
xin û hûn ê li cem Xwedayê xwe
XUDAN bi bîr ve bên û ji neyarên
xwe ve xelas bibin. 10 Û di roja
xwe yî kêfxweşiyê de û di cejnên
xwe yî eşkere de û di seriyên
mehên xwe de, li ser pêşkêşiyên
xwe yî şewitandinê de û li ser qur-
banên pêşkêşiyên xweşiyê de hûn
ê li boriya bixin û dê li cem Xwe-
dayê we bona we bibin bîranîn; ez
Xwedayê we XUDAN im.

*Îsraêlî ji Sînayê cuda dibin*

4.Mûs 9,17-18

11 Û wusa bû ku, di sala duwemîn
de, di meha duwemîn de û di
roja bîstan ya mehê de ewr ji ser
şunwara şahdeyiyê hate rakirin.
12 Û lawên Îsraêl, li gor koçên
xwe ji çola Sînayê koç kirin û ewr
li çola Paranê sekinî. 13 Û wekî
cara yekemîn be, li gor emrê XU-
DAN ya ku bi navdîtiya Mûsa bû
koç kirin. 14 Û pêşiyê ala qonaxa
lawên Cihûda li gor artêşên wan
koç kir û Nahşonê lawê Ammîna-
dab li ser artêşa wê bû. 15 Û li
ser artêşa ezbeta lawên Îsşakar
Netanelê lawê Tsûar hebû. 16 Û
li ser artêşa ezbeta lawên Zebûlûn
Elîabê lawê Helon hebû.

17 Û şunwar hate daxistin û
lawên Gerşon û lawên Merarî yên
ku şunwarê dikişandin koç kirin.
18 Û ala qonaxa lawên Rû-
ben, li gor artêşên wê koç kir û
Elîtsûrê lawê Şedeûr li ser artêşa
wê bû. 19 Û li ser artêşa ezbeta
lawên Şimeûn, Şelûmîelê lawê
Tsûrîşadday hebû. 20 Û li ser
artêşa ezbeta lawên Gad, Elîasafê
lawê Deûel hebû.

21 Û Kohatiyên ku maqdîsê
dikişandin, koç kirin û heta ku
vana dihatin yên din şunwarê ava
dikirin. 22 Û artêşa qonaxa lawên
Efrayîm, li gor artêşên wê, koç
kirin û li ser artêşa wê, Elîşamayê
lawê Ammîhûd hebû. 23 Û li ser
artêşa ezbeta lawên Manaşşe, Ga-
malîelê lawê Pedatsûr hebû. 24 Û li
ser artêşa ezbeta lawên Benyamîn,
Abîdanê lawê Gîdeonî hebû.

25 Ala qonaxa lawên Dan, yên ku
hêza paşiya hemû artêşan in, li gor
artêşên wê, koç kir û li ser artêşa
wê, Ahîezerê lawê Ammîşadday
hebû. 26 Û li ser artêşa ezbeta lawên
Aşer, Pagîelê lawê Okran hebû.
27 Û li ser artêşa ezbeta lawên
Naftalî, Ahîrayê lawê Enan hebû.
28 Li gor artêşên wan, koç kirina
lawên Îsraêl wusa bû û koç kirin.
29 Û Mûsa, ji Hobabê lawê xezûrê
Mûsa, Reûelê Midyani re got: Em
berbi cîhê ku XUDAN gotibû: Ez
ê bidim we koç dikin; bi me re
were û em ê qenciyê bi te re bikin;
ji ber ku XUDAN di derheqê Îs-
raêlê de qenciyê wad kir. 30 Û jê
re got: Ez naçim, lê belê tenê ez
ê herim welatê xwe, cem merivê
xwe. 31 Û got: Ez rica dikim, me
bernede; ji ber ku tu bi cîhên ku li
çolê em ê qonaxê deynin dizanî û
tu ji me re derbasî cotek çav dibe.
32 Û dê wusa bibe ku, ger tu bi
me re were, wê gavê dê wusa bibe
ku, XUDAN çi qenciyê bi me re
bike, em ê ji te re bikin.
33 Û ji çiyayê XUDAN, qasî
rêyekî sê rojan koç kirin û bona
ku ji wan re cîhê rawestinê bibîne,
Sindoqa Peymanê ya XUDAN di
rêyekî sê rojî de di pêşiya wan de
koç dikir. 34 Û dema ji artêşgehê
koç kirin, ewrê XUDAN bi rojê li
ser wan bû.
35 Û wusa dibû ku, dema Sindoq
koç dikir Mûsa digot: Rabe, ya
XUDAN û bila neyarên te belav
bibin û yên ku ji te dikerihin bila ji
ber te birevin! 36 Û dema ku konê
datanî digot: Ya XUDAN, vegere
bi deh hezaran hezarên Îsraêlê!

*Gel gazincan dike*

5.Mûs 9,22; 2.Mûs 16,15-18

11 Û netewe di guhê XUDAN
de bûn mîna yên ku ji xe-
rabiyê ve giliyê dikin û XUDAN
bihîst û hêrsa wî sor bû û agirê
XUDAN di nav wan de şewitî
û yên ku di qeraxa artêşgehê de
ne xwarin. 2 Û netewe feryadê
ji Mûsa re kirin û Mûsa lava ji
XUDAN re kir û agir aş bû. 3 Û
navê Tabera[1] li wê derê kir, ji ber
ku agirê XUDAN di nav wan de
şewitî.
4 Û mahdê neteweyên tevlihev
yên ku di nav wan de ne, zehf lê
vebûn[2] û lawên Îsraêl jî dîsa gi-
riyan û gotin: Dê kî bi me goşt
bide xwarin? 5 Sîr û pîvaz û pi-
rase û zebeş û xiyar û masiyê ku
li Misirê me bêpere dixwarin, di
bîra me de tê; 6 lê belê niha canê
me ziwa bû; qet tiştek nîne, ça-
vên me tenê vê mannê dibînin!
7 Û manna, mîna tova gijnîjê bû
û xuyabûna wê mîna gunuka sipî
bû. 8 Netewe digeriyan û wê di-

1 Şewat, şewitîn.

2 Îşteha wan zêde bû, an jî: Îşteha wan lê vebû.

dan hev û di aş de[1] dihêriyan, an
jî di hewanê de[2] dukutiyan û di
beroşê de dikelandin û jê pîdeyan
çêdikirin û tahma wê mîna rûnê
teze bû. 9 Û dema şevê xunav da-
diket ser artêşgehê, manna bi ser
wê ve dadiket.
10 Û Mûsa bihîst ku netewe, li gor
eşîrên wan her kes, li ber derî di-
girîn û hêrsa XUDAN zehf sor bû
û di çavê Mûsa de xerab bû. 11 Û
Mûsa ji XUDAN re got: Ma çima
te bi xerabî ji qûlê xwe re kir? Û
ma çima di çavê te de xêrê nedîtim
ku, tu hemûya barê vê neteweyê li
min bar dikî? 12 Ma ez bi hemûya
netewê ve ducani bûm? Ma qey
min wan anîne dinê ku tu ji min
re: Mîna ku dadîk[3] zarokê bi şîr
dikşîne, tu wan di himbêza xwe de
bikşîne welatê ku ji bapîrên wan
re sond xwarime dibêjî? 13 Ma ka
bona ku ez bidim hemûya vê ne-
teweyê, goşt ji ku derê bibînim?
Ji ber ku ji min re, bi gotina: Goşt
bide me û em bixwin! dibêjin û ji
min re digirîn[4]. 14 Ez tenê nikarim
hemûya vê neteweyê bikişînim, ji
ber ku ji min re zehf giran e. 15 Û
ger tuyê bi min re wusa bike, ger
di çavê te de xêrê dîtibim, ji kere-
ma xwe[5] hema min bukuje ku ez
hejartiya xwe nebînim!
16 Û XUDAN ji Mûsa re got: Ji
kalepîrên netewê, ji nav kalepîrên
Îsraêlê yên ku tu dizanî pêşhatiyên
wan in, heftê kesî ji min re bicivîne;
wan bînin Çadira Civandinê û bila
li wir bi te re bisekinin. 17 Û ez ê
dakevim û li wir bi te re biaxifim û
ez ê ji Ruhê ku li ser te ye bistînim
û deynim ser wan û bona ku tu tenê
nekişîne, dê tevî te barê netewê
bikişînin. 18 Û ji netewê re bibêje:
Bona sibê xwe pîroz bikin û hûn
ê goşt bixwin; ji ber ku we gotina:
Ka kî yê goşt bide me? Ji ber ku
li Misirê rewşa me qenc bû, girîna
xwe bi XUDAN ve dan bihîstan-
din; dê XUDAN jî goşt bide we û
hûn ê bixwin. 19 Ne rojek û du roj
û pênc roj û deh roj û bîst roj, 20 lê
belê mehek, heta ku ji pozên we re
were û kerihandinê bide we, hûn ê
bixwin; ji ber ku we XUDANê ku
di nav we de ye red kirin û li ber
wî, bi gotina: Ma çima em ji Mi-
sirê derketin? giriyan. 21 Û Mûsa
got: Netewa ku ez di nav de me şeş
sed hezar peya ne û tu: Ez ê goşt
bidim wan û dê di tûmiya mehê de
bixwin! dibêjî. 22 Ma bona ku ew
bên têr kirin, dê ji wan re mîh û de-
war bên serjê kirin? An jî bona ku
ew bên têr kirin, dê hemû masiyên
behrê ji wan re bên hevdan? 23 Û

1 Bi texmîneki jî bi destdarê dihêriyan.
2 Di sîrkutê de.
3 Dadîk, lele, an jî: Dadok.
4 Li ber min digirîn.
5 An jî: Ez hewînê dikim.

XUDAN ji Mûsa re got: Ma destê
XUDAN kin bûye? Ka dê gotina
min ya ji te re bibe an jî nebe, tuyê
niha bibînî?
24 Û Mûsa derket û gotinên XU-
DAN ji netewê re got û ji kalepîrên
netewê ve heftê kesî civandin û
wan li dora Çadirê sekinandin.
25 Û XUDAN ji ewr daket û jê re
got û ji Ruhê ku li ser wî ye rahişt
û danî ser heftê kalepîrî û wusa bû
ku, dema Ruh daket ser wan pey-
xambertiyê kirin, lê belê carekî
din jî nekirin.
26 Û li artêşgehê du heb zilam man,
navê yekî Eldad û yê din jî Medad
bû û Ruh bi ser wan vç jî daket û
ew di nav yên ku hatine nivîsan-
din de bûn, lê belê hilnekişiyabûn
Çadirê û li artêşgehê peyxamber-
tiyê kirin. 27 Û xortek baz da û
ji Mûsa re gîhand û got: Eldad û
Medad li artêşgehê peyxamberti-
yê dikin. 28 Û yek ji zilamên ku
wî wan bijartibûn, xizmetkarê
Mûsa, Yêşûyê lawê Nûn bersivê
da: Efendiyê min Mûsa, nehêle
ew bikin[1]! 29 Û Mûsa jê re got:
Ma tu bona min çavnebariyê dikî?
Xwezîka hemûya netewa XU-
DAN peyxamber bibûna, XU-
DAN Ruhê xwe daniya ser wan!
30 Û Mûsa, ew bi xwe û kalepîrên
Îsraêlê vekişiyan artêşgehê.

*Xudan Sûsikan dişîne*

31 Û ji aliyê XUDAN ve bayek
derket û ji çem sûsikan anîn û li
dora artêşgehê, li vî alî qasî rêya
di dûriya rojekê de û li aliyê din
qasî rêya di dûriya rojekê de û
wekî ji rûyê erdê ve bi du gezî ber
ve jor bilindtir be, li ser artêşgehê
wan xistin. 32 Û di hemûya wê
rojê û tûmiya wê şewê de û di tû-
miya dotira rojê de netewe rabûn
û sûsikan dan hev; yê herî hindik
da hev, deh homer[2] da hev û bona
xwe wan li dora artêşgehê rêz ki-
rin[3]. 33 Û hîn goşt di nav diranên
wan de bûn, berî ku bicûn, hêrsa
XUDAN li dijî neteweyê sor bû
û XUDAN bi lêxistinek mezin li
netewê xist. 34 Û navê Kîbrot-
Hattaava[4] li wir kirin, ji ber, nete-
wa ku mahdên wan rabûne li wir
binax kirin. 35 Netewe ji Kîbrot-
Hattaavayê berbi Hatserotê koç
kirin û li Hatserotê man.

*Gazincên Mîryam û Harûn*

5.Mûs 24,9

12 Û Mîryam û Harûn, ji ber
pîreka Hebeşî ya ku pê re ze-
wiciye, li dijî Mûsa axifîn; ji ber ku
ew bi pîrekek Hebeşî ve zewicîbû.
2 Û gotin: Ma qey XUDAN tenê bi
navdîtiya Mûsa ve got? Bi navdîti-
ya me jî negot? Û XUDAN bihîst.

---

[1] Wan bisekinînin, an jî: Ji wan re bibe astengî.
[2] Li rasteka menan binêrin.
[3] Raxistin.
[4] Gorên bijê.

dîtin zilamên qam dirêj bûn. 33 Û
me li wir lawên Anak yên ku ji Ne-
fîlîmê[1] ne, Nefîlîmê dîtin û di ça-
vên xwe de em mîna kulliyan bûn
û di çavên wan de jî em wusa bûn.

*Gel Serî hildide*

4.Mûs 13,25-33; 5.Mûs 1,32-40;
4.Mûs 32,7-13

14 Û hemûya civakê dengê
xwe bilind kir û qêriyan
û netewe wê şevê giriya. 2 Û
hemûyên lawên Îsraêl li dijî Mûsa
û Harûn gotegotê kirin û hemûya
civakê ji wan re gotin: Xwezîka
em li çola Misirê bimiriyana!
An jî, xwezîka em li vê çolê
bimiriyana! 3 Û ma çima bona ku
em bi şûr ve bikevin, XUDAN me
dibe vî welatî? Dê pîrek û zarokên
me bibin xenîmet; gelo bona me
vegera Misirê ne qenctir e?
4 Û ji hev û din re gotin: Em yekî ji
xwe re bikin serî û vegerin Misirê!
5 Wê gavê Mûsa û Harûn, li ber
koma civaka hemûyên lawên Îs-
raêl bi ser rû ve ketin. 6 Û ji yên ku
sîxûrtiyê li welêt ve kirine, Yêşûyê
lawê Nûn û Kalebê lawê Yefûnne
kincên xwe çirandin 7 û bi civaka
hemûyên lawên Îsraêl re axifîn û ji
wan re gotin: Welatê ku em bona
sîxûrtiyê lê bikin tê de derbas bûn
welatekî zehf, zehf qenc e. 8 Ger
XUDAN ji me razî be, wê gavê dê
me bîne welêt û dê wê bide me;
welatekî wusa ku şîr û hungiv di-
herike. 9 Lê li dijî XUDAN rane-
bin û hûn ji gelê welêt ve netirsin;
ji ber ku em ê wan mîna nan daqur-
tînin; piştgirê[2] ku wan diparêze, ji
ser wan vekişiyaye û XUDAN bi
me re ye; ji wan metirsin! 10 Lê
belê hemûya civakê gotin: Em wan
bidin ber keviran. Û mezintiya
XUDAN di Çadira Civandinê de
ji hemûyên lawên Îsraêl re xuyabû.
11 Û XUDAN ji Mûsa re got: Dê
heta çi wextî ev netewe min biçûk
bibînin? Û li ber hemû nîşanên
ku di nav wan de kirime, dê heta
çi wextî baweriyê bi min neynin?
12 Ez ê bi webayê li wan bixim,
ez ê wan ji mêrasê ve mehrûm
bikim û ez ê te bikim neteweyek
ji wan mezintir û xwurttir.
13 Û Mûsa ji XUDAN re got: Wê
gavê dê Misirî bibhîzin; ji ber ku
te vê neteweyê bi qudreta xwe ji
nav wan ve derxist 14 û dê ji gelê
vî welatî re bibêjin. Bihîstin ku,
tu, XUDAN, di nav vê netewê de
yî; ji ber ku tu, XUDAN rû bi rû
tête xuyanî kirin û ewra te li ser
wan disekine û tu ji pêşiya wan
bi rojê di sitûna ewrê de û şevê
di sitûna agir de dimeşî. 15 Û ger
tu vê neteweyê mîna zilamekî bu-
kujî, wê gavê neteweyên ku nav
û dengê te bihîstine dê biaxifin û

1 Zilamên girs.

2 Sîh, an jî: Sîwan.

bibêjin: 16 Ji ber ku XUDAN hêz
neanî ku vê netewê bibe welatê ku
ji wan re sond dayîbû, wan li çolê
kuşt. 17 Û niha bila qudreta XU-
DAN mezin be, çawa ku te axifî
û got: 18 XUDAN zehf bi sebir
e û dilovaniya wî pirr e, li fesa-
diyê û gunehê diborîne û tu carî
yê bisûc perwerde nake, fesadiya
bavan heta nifşeyên sêwem an
jî çaremîn di zarokan de digere.
19 Ji Misirê heta vir te çawa li vê
neteweyê borandibe, fesadiya vê
netewê li gor mezintiya dilovani-
ya xwe biborîne!
20 Û XUDAN got: Li gor gotina
te borandim. 21 Lê belê bona mafê
hebûniya min, dê hemûya dinê bi
mezintiya XUDAN ve tijî bibe;
22 madem hemûyên van zilamên
ku mezintiya min û elametên ku
li Misirê û li çolê kirime dîtine, bi
vî awayî jî deh carî min ceriban-
din û gotina min guhdarî nekirin;
23 rastî, dê welatê ku ji bapîrên
wan re sond dayîme nebînin û ji qet
kesekî ku min biçûk dibîne, dê wê
nebîne! 24 Tenê ez ê qûlê xwe Ka-
leb bibim welatê ku ketiyê[1] û dê nî-
jada wî wê bi mêrasî bigre, ji ber ku
di wî de ruhekî din heye û bitûmî li
pêy min meşiyayî. 25 Amalekiyan
û Kenaniyan li newalê rûdinin; sibê
vegerin û ji rêya Behra Gewez ve
herin çolê.

[1] An jî: Welatê ku ew çûye wê.

26 Û XUDAN bi Mûsa û Harûn
re axifî û got: 27 Ez ê heta kengê
ji vê netewa ku li dijî min gote-
gotê dikin re di ber xwe de bi-
dim? Bihîstim ku lawên Îsraêl li
dijî min dibêjin. 28 Ji wan re bi-
bêje; XUDAN dibêje: Bona mafê
hebûniya min, mîna ku we ji min
re gotine, rastî ez ê ji we re wusa
bikim! 29 Dê laşên we di vê çolê
de bikevin û hemûyên ku ji we
hatine jimartin, li gor hemûya hej-
mara we, yên bîst salî û jê berjor-
tir, di derheqê min de gotegotê di-
kin, 30 bi rastî jî ji we re, ji welatê
sond dayîme we ku ez ê we li wir
bidim rûniştandin, xeynî Kalebê
lawê Yefûnne û Yêşûyê lawê Nûn
dê tu kes nekevinê! 31 Lê belê ez
ê zarokên we yên ku hûn dibêjin
dê bibin xenîmet bibim wir û dê
ew ê welatê ku we red kirine bi-
nasin! 32 Lê belê dema em werin
we, dê laşên we li vê çolê bikevin.
33 Û dê zarokên we çel sal li çolê
bibin şivan û heta ku laşên we li
çolê biqelihin dê bêdilsoziya we
bikişînin. 34 Li gor hejmara rojên
ku we sîxûrtiyê li welêt kirine,
çel roj, bona her rojî salekî, çel
sal hûn ê fesadiyên xwe bikişînin
û hûn ê bi wec zivirandina min
bizanibin! 35 Ez, XUDAN, go-
tim, ez ê bi rastî jî vêya li hemû
vê civaka xerab ya ku li dijî min
civiyane re bikim! Dê li vê çolê
biqelihin û li wir bimirin!

36 Û zilamên ku Mûsa wan bona
sîxûrtiyê li welêt bikin şandine û
şunda hatine û di derheqê welêt
de agahiyên nebaş anîne û bi vî
awayî hemûya civakê li dijî wî
dane gotegot kirin, 37 ev zilamên
ku di derheqê welêt de agahiyên
xerab anîne, li ber XUDAN bi
webayê mirin. 38 Lê belê ji van
zilamên ku bona sîxûrtiyê li welêt
bikin çûyîne, Yêşûyê lawê Nûn û
Kalebê lawê Yefûnne sax[1] man.
39 Û Mûsa van gotinan ji hemûyên
lawên Îsraêl re got û netewe şînekî
mezin girtin. 40 Û sibehê zû rabûn
û hilkişiyan serê çiyê û gotin: A
vay, em û em ê hilkişin cîhê ku XU-
DAN gotiye; ji ber ku me sûc kirin.
41 Û Mûsa got: Ev qenc naçe! Çima
niha hûn êrîşî emrê XUDAN dikin?
42 Hilnekişin, ji ber ku XUDAN ne
di nav we de ye; hûn li ber neyarên
xwe neyên lêxistin. 43 Ji ber ku
Amalekî û Kenanî li wir li pêşiya
we ne û hûn ê bi şûr ve bên lêxis-
tin; madem ku hûn li pêy XUDAN
çûyînê vegeriyan, dê XUDAN
ne bi we re be. 44 Lê belê bona
ku hilkişin serê çiyê bi xwe ewle
bûbûn; lê belê Sindoqa XUDAN ya
peymanê û Mûsa ji nava artêşgehê
ve neqetiyan. 45 Wê gavê Amalekî
û Kenaniyên ku li çiyê rûdinin û
heta Hormayê li wan xistin û wan
şikestandin.

*Qaîdeyên di derbarê Pêşkêşiyan de*
4.Mûs 28,3-13

15 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 2 Bi lawên Îsraêl re bi-
axife û ji wan re bibêje: Dema hûn
bikevin welatê ku ez didim we û hûn
ê tê de rûnin, 3 dixwaze bila bona
qewl dayînê pêşkêşiya şewitandinê
be, qurban be, pêşkêşiya ku bi agir
ve ji XUDAN re tête çêkirin be, an
pêşkêşiya ji dil be, an jî dema di
cejnên xwe yî eşkere de bona hûn
ji XUDAN re bikin bêhnxweşî ji
dewar an jî ji mîhan pêşkêş bikin;
4 yê ku pêşkêşiya xwe pêşkêş bike
bila ji XUDAN re wekî pêşkêşiya
nan be, dê ji deh parî pariyekî efayê
arvanê ziravê ku bi rûnê ji çar parî
pariyek hînê[2] yî hatiye sitirandin
pêşkêş bikin 5 û bona pêşkêşiya
şewitandinê an jî qurbanê, bona her
yek berxikê, tuyê wekî pêşkêşiya
rijandinê be, ji çar parî pariyekî
hînê xemrê amade bike. 6 An jî
bona beran pêşkêşiya nan, tuyê ji
deh parî du pariyên efayê arvanê
ziravê ku bi rûnê ji sê parî pari-
yek hînê yî hatiye sitirandin ama-
de bike 7 û wekî ku ji XUDAN re
bibe bêhnxweşî bona pêşkêşiya ri-
jandinê tuyê ji sê parî pariyekî hînê
xemrê pêşkêş bike. 8 Û bona ku
pêşkêşiya şewitandinê, an jî qew-
lê bidî wekî qurban be, an jî wekî
ku ji XUDAN re bibe pêşkêşiyên

1 Xweş, an jî: Zindî.

2 Li rasteka menan binêrin.

xweşiyê dema te ganêrekî ciwan
amade kir, 9 ganêr û pêşkêşiya nan,
dê ji deh parî sê pariyên efayê ar-
vanê ziravê ku bi rûnê ji nîv parîkê
hînêyî hatiye sitirandin bête pêşkêş
kirin 10 û wekî pêşkêşiya rijandinê
be, pêşkêşiya ku bi agir ve têle çê-
kirin, wekî ku ji XUDAN re bibe
bêhn xweşî tuyê nîv hîn xemrê
pêşkêş bike.
11 Bona her ganêrî an jî beranî, an
jî bona her yek berxik û karikên
nêr, dê wusa bête kirin. 12 Li gor
hejmara ku hûn ê amade bikin, li
gor hejmara wan hûn ê bona her
yekê wusa bikin. 13 Her kesê
welêt, dema ji XUDAN re wekî
bêhnxweşî be, pêşkêşiya ku bi agir
ve tête pêşkêş kirin pêşkêş bike, dê
van tiştan wusa bikin. 14 Xerîbek, ê
di nav we de mêvan e, an jî her yek
zilamekî di tûmiya nifşeyên we de
di nav we de be, dema ji XUDAN
re wekî bêhnxweşî be, pêşkêşiya ku
bi agir ve tête pêşkêş kirin pêşkêş
bike, hûn çawa bikin, dê ew jî wusa
bikin. 15 Bona komelê, bona we û
xerîbê ku di nav we de mêvan e
zagonek, dê di tûmiya nifşeyên
we de bibe zagonek abadîn; li ber
XUDAN hûn çawa bin, dê xerîb
jî wusa be. 16 Bona we û bona bi-
yanê ku bi we re mêvan e, dê zagon
yek û ûsil yek be.
17 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 18 Bi lawên Îsraêl re biaxife û
ji wan re bibêje: Dema hûn bike-
vin welatê ku ez we dibim wir,
19 dê wusa bibe ku, dema hûn ji
nanê wî welatî bixwin, hûn ê ji
XUDAN re pêşkêşiyekî rakirinê
pêşkêş bikin. 20 Ji arvanê xwe
yî pêşîn wekî pêşkêşiya rakirinê
be hûn ê pîdeyekê pêşkêş bikin;
hûn ê wê mîna pêşkêşiya rakirinê
ya bênderê rakin. 21 Di nifşeyên
we de ji arvana xwe yî pêşîn wekî
pêşkêşiya rakirinê, ji XUDAN re
pêşkêş bikin.

*Pêşkêşiya bona gunehê*

3.Mûs 4

22 Û hûn kengê şaş bibin û hemû
tiştên ku XUDAN ji Mûsa re go-
tiye û bi navdîtiya Mûsa XUDAN
ji we re emir dayîne, 23 ji roja ku
XUDAN emir dayiye dest pê bikin
û ji wê di tûmiya nifşeyên xwe
de, ger hûn bi van emran negirin,
24 dê wê gavê wusa bibe ku, ger bi
xeletî, di nezaniya civakê de dîsa
jî bête kirin, hemûya civakê dê ji
XUDAN re wekî bêhnxweşî be,
pêşkêşiya şewitandinê, ganêrekî
ciwan, li gor ûsilê wekî pêşkêşiya
wê yî nan bi pêşkêşiya rijandinê
ve û pêşkêşiya wê yî sûcê be, dê
nêriyekî pêşkêş bikin. 25 Û dê
kahîn bona hemûya civaka lawên
Îsraêl kefaretê bike û dê ji wan re
bête borîn. Ji ber ku xeletiyek bû
û bona xeletiyên xwe pêşkêşiyên
xwe, pêşkêşiya ku ji XUDAN re
bi agir ve tête kirin û li ber XU-

DAN pêşkêşiya wanî sûcê anîne 26 û dê ji hemûya civaka lawên Îsraêl û ji xerîbê ku di nav wan de mêvan e re bête borandin; ji ber ku xeletî aidî hemûya civakê ye.
27 Û ger canek bi xeletî sûcekî bike, wê gavê, wekî qurbana sûcê be divê bizinek yek salî pêşkêş bike. 28 Û dema bi xeletî li ber XUDAN sûcê bike, dê ji bo wî kefaret bête kirin, kahîn bona canê ku xeletiyê kiriye kefaretê bike û dê ji wî re lêborîn bibe. 29 Di nav lawên Îsraêl de dixwaze ji gelê welêt be û dixwaze jî xerîbê ku di nav wan de mêvan be, dê bona kesê ku bi xeletî tiştekî bike zagona we yek be. 30 Lê belê dixwaze ji alî be, an jî ji xerîb be, canê ku mexsûs bike, ji XUDAN re kufur kiriye û dê ew can ji nav netewa xwe ve bête avêtin. 31 Ji ber ku emrê XUDAN biçûk dîtiye û emrê wî xera kiriye, dê ew can muheqeq bête avêtin; dê fesadiya wî li ser wî be.

*Yên ku Roja Sebtê nagirin têne kuştin*

2.Mûs 31,12-17; 35,1-3

32 Û dema lawên Îsraêl li çolê bûn, di roja Sebtê de zilamekî ku êzinga dide hev dîtin. 33 Û yên ku wî di êzing danhevdinê de dîtine, wî anîn cem Mûsa û Harûn û hemûya civakê. 34 Û wî heps kirin, ji ber ku ka dê ji wî re çi bête kirin nehatibû gîhandin. 35 Û XUDAN ji Mûsa re got: Dê ew zilama muheqeq bête kuştin, hemûya civakê, dê li derveyî artêşgehê wî bi kevir ve birecimînin. 36 Û hemûya civakê wî derxistin derveyî artêşgehê û mîna ku XUDAN emir dabû Mûsa, wî bi kevir ve recimandin û mir.

*Qaîdeyên di derbarê Kincan de*

5.Mûs 6,6-9

37 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û jê re got: 38 Bi lawên Îsraêl re biaxife û ji wan re bibêje: Bila di tûmiya nifşeyên xwe de li dawên kincên xwe pasarê çêbikin û bila qordona lacîwerdî deynin ser pasarê her dawî 39 û bona ku hûn wê bibînin û hemû emirên XUDAN di bîra xwe de bînin û bi wan bigirin û bona ku hûn li pêy çav û dilên xwe yên ku di pêy de zinê kirine neçin, dê bona we bibe pasar; 40 da ku, hûn hemû emirên min di bîra xwe de bînin û bigirin û ji Xwedayê xwe re pîroz bibin.
41 Ez Xwedayê we XUDANê ku, bona ji we re bibe Xwedê we ji welatê Misirê ve derxistiye me; ez Xwedayê we XUDAN im.

*Korah, Datan û Abîram serî hildidin*

4.Mûs 26,8-11; Zeb 106,16-18; Îbr 10,31

16 Û Korahê lawê Yîtsharê lawê Kohatê lawê Lêwî, ji lawên Rûbenê Datan û Abîramê lawên Elîab, Onê lawê Pelet û tevî wî zilaman rahişt 2 û ji lawên

Îsraêl zilaman, du sed û pêncî be-
gên civakê, yên ku ji wan re ban-
ga komelê hatine, tevî zilamên
bi nav û deng li dijberê Mûsa
rabûn 3 û li dijî Mûsa û Harûn li
dora hev civiyan û ji wan re go-
tin: Êdî bes e! ji ber ku hemûya
civakê, her yek ji wan pîroz in û
XUDAN di nav wan de ye! û ma
çima hûn li ser komela XUDAN
xwe bilind dikin?
4 Û gava Mûsa bihîst, bi ser rû ve
ket 5 û bi Korah re û ji hemû he-
valên[1] wî re axifî û ji wan re got:
Sibehê dê XUDAN yê ku ê wî ye
û yê ku pîroz e, bide xuyanî kirin
û dê wî li xwe nêzîk bike; zilamê
ku bijartiye jî dê ji xwe re nêzîk
bike. 6 Wêya bikin ya Korah û
hemû hevalên wî, ji xwe re bu-
xurdanan bistînin 7 û sibê agir bi-
xin wan û buxurê deynin ser wan
û dê wusa bibe, zilamê ku XU-
DAN wî hilbijêre, yê ku dê pîroz
bibe ew e; ya lawên Lêwî êdî bes
e! 8 Û Mûsa ji Korah re got: Ya
lawên Lêwî, niha guhdarî bikin!
9 Xwedayê Îsraêlê bona ku we ji
civaka Îsraêlê nêzîktirî xwe bike,
bona kirina xizmeta şunwara XU-
DAN û bona ku ji civakê re xiz-
metê bikin, hûn li ber wan bise-
kinin, we cuda kir 10 û te û tevî
te hemû birayên te; lawên Lêwî
ji xwe re nêzîktir kir; ma ev tişt
ji we re biçûk tête xuyanî kirin?
Qey hûn li kahîntiyê jî digerin?
11 Bo vê yekê tu û hemû hevalên[2]
te hûn li dijî XUDAN civiyane û
ma Harûn çi ye ku, hûn li dijî wî
gotegotê dikin?
12 Û Mûsa bona ku bangî Datan û
Abîramê lawên Elîab bikin, zilam
şand û wan got: Em dernakevin!
13 Bona ku li çolê me bukujin, te
ji welatê ku şîr û hungiv diherike
me derxist, ma qey ev tiştekî hin-
dik e, di ser de jî tu dixwazî xwe
li ser me bike serok? 14 Xeynî
vêya, te me neanî welatê ku jê şîr
û hungiv diherike û te bi mêrasî
zevî û rezan nedan me; ma qey
tu dixwazî van zilaman kor bikî?
Em dernakevin!
15 Û Mûsa gellekî hêrs bû û ji
XUDAN re got: Nezivire û li
pêşkêşiyên wan nenihêre! ji wan
tenê kerekî jî nestendim û ji wan bi
tu kesî ve xerabiyê nekirim. 16 Û
Mûsa ji Korah re got: Tu û hemû
hevalên te, tu û ew û Harûn, sibê
li ber XUDAN bin 17 û ji we her
yek buxurdanên xwe rahêlin û
buxurê deynin ser wan û ji we her
yek bila buxurdanên xwe rahêlin
û du sed û pêncî buxurdanî bînin
ber XUDAN; tu û Harûn hûn her
du jî buxurdanên xwe bînin. 18 Û
her yek buxurdanên xwe anîn û
agir xistin wan û buxurê danîn ser

---

[1] Alîgir, an jî: Piştvan.

[2] Civaka te, an jî: Alîgirên te.

wan û tevî Mûsa û Harûn di deriyê
Çadira Civandinê de sekinîn. 19 Û
Korah li dijî wan hemûya civakê
li deriyê Çadira Civandinê de
civandin û mezintiya XUDAN ji
hemûya civakê re hate xuyanîbûn.
20 Û XUDAN bi Mûsa û Harûn
re axifî û ji wan re got: 21 Ji vê
civakê ve cuda bibin ku ez wan
nişka ve biqedînim! 22 Û bi ser
wecê xwe ve ketin û gotin: Ya
Xwedê, Xwedayê ruhê hemû mi-
rovan! ma dema zilamek sûcekî
bike, tu li dijî hemû civakê re hêrs
dibî? 23 Û XUDAN bi Mûsa re
axifî û jê re got: 24 Bi civakê re
biaxife û ji wan re bibêje: Ji dora
şunwara Korah, Datan û Abîram
vekişin.
25 Û Mûsa rabû û çû cem Datan û
Abîram û kalepîrên Îsraêlê li pêy
wî çûn. 26 Û bi civakê re axifî û
ji wan re got: Ez rica dikim, bona
ku hûn bi hemû sûcên wan ve tune
nebin ji dora çadirên van zilamên
xerab vekişin û destê xwe li tu
tiştên ku aidî wan in nexin! 27 Û
ji her aliyê şunwara Korah, Da-
tan û Abîram vekişiyan û Datan
û Abîram derketin û jinên wan û
lawên wan û zarokên wanî biçûk
di deriyê çadirên xwe de sekinîn.
28 Û Mûsa got: Hûn ê bi vêya bi-
zanibin ku bona kirina hemû van
karan XUDAN min şandiye; ji ber
ku min wan bi serê xwe ve çêne-
kirine. 29 Ger van zilaman mîna
mirina her kesî bimirin, an jî mîna
sehêtî bûna her kesî bên sehêtî
kirin, wê gavê wusa tê ku XU-
DAN min neşandiye. 30 Lê belê
ger XUDAN tiştekî nû bike û erd
devê xwe veke û wan û her tiştên
aidî wan daqurtînin û bi zindîtiyê
dakevin warê miriyan, wê gavê
hûn ê fêhm bikin ku van zilaman
ji XUDAN re bêhurmeti kirine.
31 Û wusa bû ku, dema wî gotina
hemû van tiştan qedand, erdê bin
wan qelişî 32 û erd devê xwe vekir
û wan û maliyên wan û hemû zi-
lamên Korah û hemû malên wan
daqurtandin. 33 Ew û hemû tiştên
ku aidî wan in bi zindiyî daketin
warê miriyan û erd bi ser wan ve
hatin girtin û ji nav komelê ve tune
bûn. 34 Û hemû Îsraêl a ku li dora
wan in, ji dengên wan reviyan, ji
ber ku: Bila erd me danequrtîne!
gotin. 35 Û agir ji cem XUDAN
ve derket û du sed û pêncî kesên
ku buxurê pêşkêş dikin, xwarin û
qedandin.
36 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û jê re got: 37 Ji Eleazarê lawê
kahîn Harûn re bibêje, bila bu-
xurdanan ji nav şewatê ve rakin
û agir bi aliyê wêdetir ve belav
bike, 38 ji ber ku wan, buxur-
danên van zilamên ku bi bihaya
jiyana xwe sûcê kirine, pîroz in û
bila wan bona pêşkêşîgehê wekî
rûberê, bikin lewhayên hatine ku-
tandin; ji ber ku wan li ber XU-

DAN pêşkêş kirin; ji ber vê yekê
pîroz in û dê ji lawên Îsraêl re
bibin nîşan. 39 Û kahîn Eleazar
buxurdanên tûnc ên ku zilamên
hatine şewitandin pêşkêş kirine,
li gor XUDAN bi navdîtiya Mûsa
jê re gotiye rahiştin 40 û bona ku
xerîbek ne ji nîjada Harûn e, ji bo
li ber XUDAN buxurê vêxe nêzîk
nebe û nebe mîna Korah û hevalên
wî, ji bo ku ji lawên Îsraêl re bibe
bîranîn, ji pêşkêşîgehê wekî rûber
be buxurdanan kutandin.
41 Lê belê dotira rojê hemû civaka
lawên Îsraêl li dijî Mûsa û Harûn
ve gotegotê kirin û gotin: We ne-
tewa XUDAN kuştin! 42 Û wusa
bû ku, dema civak li dijî Mûsa û li
dijî Harûn civiyan, berê xwe dan
Çadira Civandinê û a vay, ewr wê
nuxumand û mezintiya XUDAN
hate xuyanîbûn. 43 Û Mûsa û
Harûn hatin ber Çadira Civandinê.
44 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 45 Ji nav vê civakê derkevin
ku ez wan nişka ve biqedînim!
46 Û bi ser wecê xwe ve ketin. Û
Mûsa ji Harûn re got: Buxurdana
xwe rahêle û ji ser pêşkêşîgehê
agir bixê û buxurê deyne ser wê û
zû wê ji civakê re bibe û bona wan
kefaretê bike; ji ber ku ji ber XU-
DAN xezeb derket; weba dest pê
kiriye. 47 Û mîna ku Mûsa gotiye
Harûn rahişt û baz da nava civakê
û a vay, di netewê de weba destpê
kiribû û buxurê danî û bona ne-
tewê kefaretê kir. 48 Û di nava
mirî û zindiyan de sekinî; weba jî
hate birrîn. 49 Û xeynî yên ku di
mesela Korah de mirine, yên ku
ji webayê mirîne çardeh hezar û
heft sed kes bûn. 50 Û Harûn ve-
geriya cem Mûsa, deriyê Çadira
Civandinê; weba jî hate birrîn.

*Çoyê Harûn*

Îbr 5,4

17 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Ji lawên Îsraêl
re bibêje û ji wan çoyan bistîne,
wekî bona her malekî bapîran
yek be, li gor malên bapîrên wan
ji hemû begên wan donzdeh ço
bistîne; navê her kesî li ser çoyên
wan binivîsîne. 3 Û tuyê navê
Harûn li ser çoyê Lêwî binivîsî-
ne; ji ber ku dê bona her serokê
malên bapîran çoyek hebe. 4 Û
tuyê wan deyne ber şahdeyiya ku
di Çadira Civandinê de li wir ha-
tibûm cem we. 5 Û dê wusa bibe
ku, dê kulîlk di çoyê zilamê ku
bijartime de bişkivin û ez ê xwe ji
gotegota lawên Îsraêl ya ku li dijî
we dibêjin xelas bikim. 6 Û Mûsa
ji lawên Îsraêl re got û hemû be-
gên wê çoyan dan wî, bona malên
bapîrên xwe wekî her beg yekê
bide, bi tûmî donzdeh hebî dan;
çoyê Harûn jî di nav çoyên wan
de bû. 7 Û Mûsa çoyan li Çadira
Civandinê danîn ber XUDAN.
8 Û wusa bû ku, dotira rojê Mûsa

ket Çadira Şahdeyiyê û a vay, çoyê
Harûn ya ku bona mala Lêwî bû
kulîlkan aj dabû, bişkivîn û çîçe-
gan dan û bihîvên gehîştî dan. 9 Û
Mûsa hemû çoyan ji ber XUDAN,
bona lawên Îsraêl derxist û nihêrtin
û her kes çoyê xwe rahiştin. 10 Û
XUDAN ji Mûsa re got: Bona ku
li dijî lawên serhildanê wekî nîşanê
bête veşartin, çoyê Harûn dîsa dey-
ne ber şahdeyiyê û ji bo ku nemirin,
gotegotên wan ji ser min ve rake.
11 Û Mûsa wusa kir; XUDAN
çawa emir dabe wî, ew jî wusa kir.
12 Û lawên Îsraêl bi Mûsa re axi-
fîn û gotin: A vay, em qediyan,
helaq bûn; em hemû helaq bûn!
13 Her yê ku nêzîk dibe, yê ku
nêzîkî şunwara XUDAN dibe di-
mire; gelo em ê hemû biqedin?

*Wezîfeya Kahîn û Lêwiyiyan*
1.Dîr 23,24-32

18 Û XUDAN ji Harûn re got:
Tu û tevî te lawên te û mala
bapîrên te, hûn ê gunehê ku aidî
cîhê pîroz e bikişînin û tu û bi
te re lawên te, hûn ê gunehê aidî
kahîntiyê ye bikişînin. 2 Û bona
ku bi te ve bên girêdan û ji te re
xizmetê bikin birayên xwe, ezbeta
Lêwî, ezbeta bapîrê xwe jî bi xwe
re nêzîk bîne; lê tu û bi te re lawên
te, hûn ê li ber Çadira Şahdeyiyê
bin. 3 Û dê notirvaniya te û hemû
notirvaniya Çadirê bigirin; lê bona
ku him ew, him jî hûn nemirin,
dê nêzîkî taximên cîhê pîroz û
pêşkêşîgehê nebin. 4 Û dê bi te re
bên girêdan û bona her xizmeta
Çadirê dê notirvaniya Çadira Ci-
vandinê bigirin û dê biyan nêzîkî
we nebin. 5 Û bona ku êdî li ser
lawên Îsraêl ve xezeb nebe, hûn ê
notirvaniya cîhê pîroz û notirvani-
ya pêşkêşîgehê bigirin. 6 Û a vay,
min ji nav lawên Îsraêl ve birayên
we, Lêwiyiyan rahişt; bona xiz-
meta Çadira Civandinê bikin ew
ên ku ji XUDAN re hatine dayîn
ji we re xelat in. 7 Û tu û tevî te
lawên te hûn ê bona her tiştên
pêşkêşîgehê û bona aliyê hundir
yê perdê, kahîntiya xwe bigirin, ez
xizmeta we yî kahîntiyê bi xelatî
didim we û biyanê ku nêzîk were,
dê bête kuştin.

*Para Kahîn û Lêwiyiyan*
3.Mûs 7,29-36; Hêz 44,28-30; 1.Kor 9,13

8 Û XUDAN ji Harûn re got: Û a
vay, ez, notirvaniya pêşkêşiyê xwe
yî rakirinê, ya hemû tiştên pîroz
yên lawên Îsraêl dam te; wan ji ber
meshê dam te û wekî para abadîn
be, dam lawên te. 9 Ji tiştên herî
pîroz yên ku ji agir ve hatine girtin,
dê ev bibin yên te: Her pêşkêşiyên
wanî ji min re bînin, her pêşkêşiyên
wanî nan û her pêşkêşiyên wanî
sûcê û her pêşkêşiyên wanî gunehê,
dê bona te û lawên te zehf pîroz bin.
10 Tuyê wan mîna tiştên gellekî
pîroz in bixwe; dê her mêr ji wê

bixwe; ji ber ku dê ji te re pîroz be.
11 Ev jî ya te ye: Pêşkêşiya rakirina
xelata wan, hemû pêşkêşiyên
kilkirinê yên lawên Îsraêl, min wan
ji te re û tevî te ji lawên te û ji qîzên
te re wekî para abadîn bin dan; dê
li mala te her kesê paqij be, wê bi-
xwin. 12 Giştikên nûberên ku didin
XUDAN, hemûya rûnê herî qenc
û herî qencên xemra nû û genim,
giştikan dam te. 13 Ji hemûyên
ku li welatên wan hene, mêwên
gehîştiyên pêşî ên ku ji XUDAN
re tînin, dê yên te bin; dê li mala
te her kesê paqij be, wê bixwin.
14 Dê hemû tiştên ku li Îsraêlê
hatine weqfkirin, dê yên te bin.
15 Dixwaze bila mirov be, an jî
heywan be, pêşî bûyiyê ji xwediyê
her bedenê ku ji XUDAN re pêşkêş
kirine, dê yê te be; tenê tuyê bona
pêşî bûyiyê mirov, muheqeq fidyê
bide dayîn û bona pêşî bûyiyên
heywanên mindar tuyê fidyê bide
dayîn. 16 Û ji yên ku dê fidya wan
bête dayîn, ji mehekiyan pê ve,
li gor qîmeta ku te daniye, li gor
şekelê cîhê pîroz, ew bîst gera ye;
tuyê wekî pênc şekelî fidyê bide
dayîn. 17 Lê tuyê bona pêşî zayiyê
çêlekê, an jî pêşî zayiyê mîhê, an
jî pêşî zayiyê bizinê fidyê nede
dayîn; ew pîroz in, tuyê xwîna
wan li ser pêşkêşîgehê ve bireşîne
û bezên wan wekî pêşkêşiya di
agir de tête çêkirin be, ji XUDAN
re wekî bêhnxweşiyê bişewitîne.
18 Û dê goştên wan bibin yên te,
mîna parxanê kilkirinê û mîna hêta
rastê dê bibin yên te. 19 Min hemû
pêşkêşiyên rakirinê yên hemû tiştên
pîroz, ên ku lawên Îsraêl ji XUDAN
re pêşkêş kirine, wekî para abadîn
dam te û bi te re law û qîzên te; ji
te re û tevî te ji nîjada te re li ber
XUDAN peymana xwê ya abadîn
e. 20 Û XUDAN ji Harûn re got:
Dê li welatên wan mêrasa te tune be
û di nav wan de dê ji te re par tune
be; di nav lawên Îsraêl de para te û
mêrasa te ez im.
21 Û a vay, li Îsraêlê hemûya dehe-
kiyan bi mêrasî dam lawên Lêwî,
bona ku bibe berdêla xizmetên ku
dikin, xizmeta Çadira Civandinê.
22 Û bona êdî bila lawên Îsraêl sûc
lênekin û nemirin, dê nêzîkî Çadi-
ra Civandinê nebin. 23 Lê belê dê
Lêwiyî xizmeta Çadira Civandinê
bikin û gunehên wan bikişînin;
dê di tûmiya nifşeyên we de bibe
zagona abadîn û dê di nav lawên
Îsraêl de mêrasa wan tune be.
24 Ji ber, dehekiya ku lawên Îsraêl
wekî pêşkêşiya rakirinê be, ji XU-
DAN re pêşkêş dikin, bi mêrasî
dam Lêwiyiyan; bo wê ji wan re
gotim: Dê di nav lawên Îsraêl de ji
wan re mêras tune be.
25 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 26 Tuyê bi Lêwiyiyan re
biaxife û ji wan re bibêje: Dema
hûn dehekiya ku ji lawên Îsraêl
ve bona we bi mêrasî dayîme

we bistînin, ji wê bona XUDAN
pêşkêşiya rakirinê, dehekiya dehe-
kiyê pêşkêş bikin. 27 Û pêşkêşiya
we yî rakirinê dê ji bênderê wekî
genim û wekî tijîbûna mahserê ji
we re bête hesibandin. 28 Bi vî
awayî ji giştikên dehekiyên xwe
yî hûn ê ji lawên Îsraêl ve bistînin,
hûn ê jî ji XUDAN re pêşkêşiya
rakirinê pêşkêş bikin û hûn ê ji wê
pêşkêşiya rakirinê ya XUDAN bi-
din Harûn. 29 Ji hemû xelatên ku
hûn ê bistînin, her pêşkêşiya raki-
rinê ya XUDAN, ji herî qenc yên
hemûyan, hûn ê ji wê ji aliyê wê
yî hatiye pîroz kirin pêşkêş bikin.
30 Bo vê yekê tuyê ji wan re bi-
bêje: Dema hûn ji wê, ya herî qenc
pêşkêş bikin, dê ji Lêwiyiyan re
mîna berê bênderê û berê mahserê
bête hesibandin. 31 Û hûn û mali-
yên we dê li her derê wê bixwin;
ji ber ku ew mişeyê we, berdêla
xizmeta we yî Çadira Civandinê
ye. 32 Û dema ji wê, ya herî qenc
pêşkêş bikin, hûn ê ji ber wê sûcê
nekişînin û hûn ê tiştên pîroz yên
lawên Îsraêl xera nekin û nemirin.

*Pakbûna yê ku gemarî têtê hesibandin*

3.Mûs 14,1-9

19 Û XUDAN bi Mûsa û
Harûn re axivî û got: 2 Ji
lawên Îsraêl re bibêje, bona ku
bila ji te re çêlekek gewez[1] ya
zexm[2], di wê de qisûr nîne bînin,
zagona şerîeta ku XUDAN ji
lawên Îsraêl re emir kiriye ev e.
3 Û hûn ê wê bidin kahîn Eleazar
û dê wê derxîne derveyî artêşgehê
û dê li ber wî bête serjê kirin 4 û
dê kahîn Eleazar bi tilîka xwe ji
xwîna wê rahêle û berbi Çadira
Civandinê heft carî ji xwîna wê
bireşîne. 5 Û dê li ber çavên wî
çêlek bête şewitandin û eyarê
wê û goştê wê û xwîna wê tevî
sergînê wê bên şewitandin 6 û dê
kahîn darê erzê û gîhayê zûfayê
û sorê rahêle û bavêje nav agirê
ku çêlek tê de tê şewitandin. 7 Û
dê kahîn kincê xwe bişo û bedena
xwe di avê de bişo û paşê bikeve
artêşgehê û dê kahîn heta êvarê
mindar be. 8 Û dê zilamê ku wê
şewitandiye kincê xwe bişo û be-
dena xwe di avê de bişo û heta
êvarê mindar be. 9 Û dê zilamekî
paqij xweliya çêlekê bide hev û dê
li derveyî artêşgehê deyne cîhekî
paqij û dê ji civaka lawên Îsraêl re
bona ava mindariyê bête veşartin;
pêşkêşiya sûcê ye. 10 Û zilamê ku
xweliya çêlekê daye hev, dê kincê
xwe bişo û heta êvarê dê mindar
be û bona lawên Îsraêl û bona xe-
rîbê ku di nav wan de mêvan e, dê
bibe zagona abadîn.
11 Yê ku destê xwe bi her yekî

1 Sor, sore, gizir.

2 Qelew, an jî: Saxlem.

meytê mirov bide, dê heft rojî min-
dar bibe; 12 di roja sêwemîn û di
roja heftemîn de dê xwe bi wê (ava
paqijbûnê) paqij bike û dê paqij
bibe; lê belê ger di roja sêwemîn
û di roja heftemîn de xwe paqij
neke, dê paqij nebe. 13 Kesê ku
destê xwe li miriyekî an jî li her
yek meytê mirovekî bixe û zilamê
ku xwe paqij neke, şunwara XU-
DAN mindar dike û dê ew can ji
Îsraêlê ve bête avêtin; ji ber ku ava
paqijbûnê bi ser wî ve nehatiye
reşandin, dê mindar be; mindariya
wî hîn di wî de ye.
14 Zagon ev e: Dema zilamek di
çadirê de mir, her zilamê ku bike-
ve çadirê û her kesê ku di çadirê de
ne, dê heft rojî mindar bibin. 15 Û
her feraxê vekirî yê ku rûberê wê li
ser ne girêdayiye, dê mindar bibe.
16 Û her kî ku destê xwe li yê ku
bi şûr ve li çolê hatiye kuştin, an
jî li miriyekî an jî li hestiyekî mi-
rovan, an jî li gorê[1] bixe, dê heft
roj mindar bibe. 17 Û dê bona zi-
lamê mindar, ji xweliya pêşkêşiya
sûcê ya ku şewitiye rahêlin û dê li
ser wê, ava ku diherike bera fera-
xekê bidin 18 û dê zilamekî paqij
gîhayê zufayê rahêle û di avê de
dake û bi ser çadirê ve û li ser
hemû feraxan û li ser zilamên ku li
wir in û li hestiyê, an jî li zilamê ku
hatiye kuştin, an jî li ser mirî, an jî
li zilamê ku destê xwe daye gorê
bireşîne 19 û zilamê paqij dê li ser
zilamê ku mindar e, di roja sêwem
û di roja heftemîn de bireşîne û dê
di roja heftemîn de wî paqij bike û
dê kincê xwe bişo û di avê de xwe
bişo û êvarî paqij bibe.
20 Lê belê zilamê ku mindar e, lê
dîsa jî xwe paqij nake, dê ji nava
komelê[2] ve bête avêtin; ji ber ku
maqdîsa XUDAN mindar kiriye;
ava paqijbûnê li ser wî ve nehatiye
reşandin; mindar e. 21 Û dê ev ji
wan re bibe zagona abadîn û zi-
lamê ku ava paqijbûnê reşandiye,
dê kincê xwe bişo û zilamê ku des-
tê xwe bi ava paqijbûnê ve xistiye,
dê heta êvarê mindar be. 22 Û her
tiştên ku zilamê mindar destê xwe
lêxistiye, dê heta êvarî mindar be û
her mirovê ku destê xwe li wî xis-
tiye, heta êvarî mindar be.

*Mirina Mîryamê û ava ku ji Zinarê derdikeve*

Zeb 106,32-33; 5.Mûs 32,48-52

20 Û lawên Îsraêl, hemûya
civakê, di meha yekemîn
de hatin çola Tsînê û netewe di
Kadeşê de rûniştin û Mîryam li
wir mir û li wir hate binax kirin.
2 Û bona civakê av tunebû û li dijî
Mûsa û li dijî Harûn civiyan. 3 Û
netewe bi Mûsa re ketin keftûleftê
û axifîn û gotin: Xwezîka dema

[1] Qebrê.

[2] Civatê.

birayên me li ber XUDAN mirin, em jî bimirana! 4 Û ma çima bona em û heywanên me li vir bimirin, we netewa XUDAN anîn vê çolê? 5 Û çima we me, bona ku bînin vî cîhê xerab ji Misirê derxistin? Ne cîhê çandinê[1] û hêjîr û rez û hinarê ye, ava vexwarinê jî nîne. 6 Û Mûsa û Harûn ji cem civakê çûn ber deriyê Çadira Civandinê û bi ser rû ve ketin û mezintiya XUDAN ji wan re hate xuyanî kirin. 7 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û got: 8 Ço rahêle û tu û birayê te Harûn civakê bidin hev û li ber çavên wan bona ku ava xwe bide, ji zinarê re bibêjin û tuyê ji zinarê ve ji wan re avê derxîne û tuyê bi civakê û bi heywanên wan re bide vexwarin. 9 Û Mûsa mîna ku emir daye wî, ço ji ber XUDAN rahişt.

10 Û Mûsa û Harûn civakê li ber zinarê civandin û ji wan re gotin: Ya asêno, niha guhdarî bikin; gelo em ji vî zinarî ji we re avê derxînin? 11 Û Mûsa destê xwe rakir û bi çoyê xwe du carî li zinarê xist û zehf av derket û civak û heywanên wan vexwarin. 12 Û XUDAN ji Mûsa û Harûn re got: Ji ber ku li ber çavên lawên Îsraêl bona ku min pîroz bikin we baweriya xwe bi min re neanîne, hûn ê vê komelê[2] nebin welatê ku dame wan. 13 Vana avên Merîba[3] ne; ji ber ku lawên Îsraêl bi XUDAN re ketin keftûleftê û wî jî pîroziya xwe nîşanî wan da.

*Edom bona derbasiya Îsraêliyan destûrê nade*

Serw 11,16-18

14 Û Mûsa ji Kadeşê şandiyan ji qiralê Edomê re şandin: Birayê te Îsraêl wusa dibêje: Tu bi hemû zehmeta ku em dikişînin dizanî; 15 bapîrên me daketin Misirê û em pirr deman li Misirê rûniştin û tevgera Misiriyan bi me û bapîrên me re xerab bû 16 û me ji XUDAN re feryadê kir û dengê me bihîst û milyaketekî şand û me ji Misirê derxist û a vay, em li Kadeşê, li serê sînorên te, li bajarekî ne. 17 Ez rica dikim, em ji welatê te ve derbas bin; em ê ji zevî û rezan ve derbas nebin û ji avên bîrê ve venexwin; em ê ji sûka qiral ve bimeşin; heta ku em ji sînorên te ve derbas bin, bi rastê an jî çepê ve çewt nebin! 18 Û Edom jê re got: Tuyê ji welatê min ve derbas nebe, ya na ez ê bi şûr ve derkevim hemberî te. 19 Û lawên Îsraêl jê re gotin: Em ê bi sûkê ve bigirin û derkevin û ger ez û keriyên min em ji avên te vexwin,

1 An jî: Zad.
2 Civatê.
3 Keftûleftê, kişkişîn.

ez ê berdêla wê bidim; ne tiştekî
din, lê tenê ez bimeşim û derbas
bibim. 20 Û got: Tuyê derbas
nebe. Û Edom bi gellekî gel û
hêzekî mezin derket pêşiya wî.
21 Û Edom nexwest ku ji sînorê
wî Îsraêl derbas bibe û Îsraêl ji
kêleka wî fitilî.

*Mirina Harûn*

4.Mûs 33,37-39; 5.Mûs 32,48-52

22 Û ji Kadeşê koç kirin û lawên
Îsraêl, hemûya civakê, hatin çi-
yayê Horê. 23 Û XUDAN, li cem
sînora welatê Edomê, li çiyayê
Horê bi Mûsa û Harûn re axifî û
got: 24 Dê Harûn beşdarî netewa
xwe bibe; ji ber ku li avên Merîba
we li dijî gotinên min serî hilda-
ne dê nekeve welatê ku dayîme
lawên Îsraêl. 25 Harûn û lawê wî
Eleazar bigirin û wan bibin çiyayê
Horê 26 û kincê Harûn jê derxîne[1]
û wan li lawê wî Eleazar bike û dê
Harûn beşdarî netewa xwe bibe û
li wir bimire. 27 Û Mûsa mîna ku
XUDAN emir daye kir û li ber
çavên hemû netewê hilkişiyan çi-
yayê Horê. 28 Û Mûsa li wir kin-
cê Harûn jê derxist û wan li lawê
wî Eleazar kir û Harûn li wir li
girê çiyê mir û Mûsa û Eleazar ji
çiyê daketin. 29 Û dema hemûya
civakê dîtin ku Harûn miriye,
hemûya mala Îsraêl sîh rojî ji
Harûn re giriyan.

*Bajarê Aradê tê tune kirin*

4.Mûs 33,40

21 Û qiralê Aradê yê Ke-
naniyê û yê ku li başûrê
rûdinişt, gava bihîst ku Îsraêl ji
rêya Atarîmê ve tê û bi Îsraêlê re
cengê kir û ji wan dîlan girt. 2 Û
Îsraêl qewlê ji XUDAN re qewil
kir û got: Ger bi rastî tu vê nete-
weyê bidî destê min, wê gavê ez
ê bitûmî bitûmî bajarên wan tune
bikim! 3 Û XUDAN dengê Îsraêl
bihîst û Kenaniyan dan dest û
bitûmî bitûmî wan û bajarên wan
tune kirin û navê Horma li wê
derê kirin.

*Marê Tûncî*

Yû 3,14-16; 1.Kor 10,9

4 Û bona ku ji çiyayê Horê li
dora welatê Edom bigerin, ji rêya
Behra Gewez ve koç kirin û di
vê rêya de canê netewê zehf aciz
bû. 5 Û netewe li dijî Xwedê û
Mûsa axifîn: Ma çima bona ku
em li çolê bimirin we me ji Mi-
sirê derxistin? Ji ber ku nan nîne
û av nîne û canê me ji vî nanê rêze
dikerihe. 6 Û XUDAN marên ku
dişewitînin şandin nav netewê û
bi netewê vedan û ji Îsraêlê zehf
gel mirin[2]. 7 Û netewe hatin cem
Mûsa û gotin: Me sûc kir, ji ber

---

1 An jî: Jêbike.

2 An jî: Pirr kes mirin.

ku li dijî XUDAN û te em axifîn;
bona ku maran ji ser me rake, lava
ji XUDAN re bike. Û Mûsa bona
netewê lava kir. 8 Û XUDAN ji
Mûsa re got: Ji xwe re marekî ku
şewitok çêbike û wê deyne ser
rewtekî û wusa bibe ku, dê her yê
ku pê hatiye vedan dema lê binê-
re, dê bijî. 9 Û Mûsa ji tûncê ma-
rekî çêkir û wê danî ser rewtekî û
wusa bû ku, dema zilamê ku mar
pê vedaye li marê tûncî binihêrta
dijiya.

*Rêwitiya ber ve Moabê*

4.Mûs 33,41-47

10 Û lawên Îsraêl koç kirin û li
Obotê konê xwe daxistin. 11 Û
ji Obotê koç kirin û li çolê li ber
Moab, li Iye-Abarîma ku berbi
rojhilatê ye, kon daxistin. 12 Û ji
wir koç kirin û li newala Zeredê
kon daxistin. 13 Ji wir koç kirin
û li çolê, li aliyê dinî çemê Ar-
nonê ya ku ji sînorê Amoriyan ve
dizê kon danîn; ji ber ku Arnon,
di navbera Moab û Amoriyan de
sînora Moabê ye. 14 Bo vê yekê
di pirtûka Cengên XUDAN de
wusa tê gotin:
Li Sûfayê newalên Vaheb û Ar-
nonê. 15 Û ber warên çemên ku
berbi şunwara Arê ve xwar bûne û
xwe sipartine sînora Moab...
16 Û ji wir koçî Beerê[1] kirin; bîra
ku XUDAN ji Mûsa re: Netewê
bide hev, ez ê avê bidim wan, ev e.
17 Wê gavê Îsraêl vê helbesta si-
tirand: Ya bîr, bipejiqe! Hûn jê re
bistirên!
18 Bîr, serokan wê kolandin,
pêşhatiyên netewê wê bi gopal û
bi çoyên xwe kolandin!
Û ji çolê koçî Mattanayê 19 û ji
Mattanayê koçî Nahalîelê û ji
Nahalîelê koçî Bamotê 20 û ji Ba-
motê koçî çemê ku li beyara Moa-
bê ye, koçî çiyayê Pîsgayê ya ku
li çolê dinihêre kirin.

*Binketina Qiral Sîhon û Og*

5.Mûs 2,24-37; 3,1-20; Zeb 136,17-22

21 Û Îsraêl ji Sîhonê qiralê Amo-
riyan re şandiyan şandin û got:
22 Bihêle ku ez ji welatê te ve
derbas bibim! Em ê berbi zevî an
jî rezan ve çewt nebin; ji avên bîrê
venexwin; heta ku em ji sînorê te
ve derbas bibin, em ê ji sûka qiral
ve bimeşin. 23 Û Sîhon Îsraêlê
ji sînorê xwe ve derbas nekir û
Sîhon hemûya netewa xwe da hev
û li dijî Îsraêlê derket çolê û hat
Yahatsê û bi Îsraêlê ve cengê kir.
24 Û Îsraêl wî da ber devê şûr û ji
Arnonê heta Yabbok, heta lawên
Ammon, welatê wî girt; ji ber ku
sînorê lawên Ammon xwurt bû.
25 Û Îsraêl hemûyên van bajaran
girt û Îsraêl, di hemûya bajarên
Amoriyan de, li Heşbonê û di
hemû gundên wê de rûnişt. 26 Ji

1 Bîr, çalav, bîra avê.

hatin cem Balam û gotinên Balak
jê re gotin. 8 Û ji wan re got: Vê
şevê li vir biborînin û li gor ya ku
XUDAN ji min re bibêje, ez ê ber-
sivê bidim we û serokên Moabê
li cem Balam man. 9 Û Xwedê ji
Balam re hat û got: Van zilamên
ku li mala te ne kî ne? 10 Balam
ji Xwedê re got: Qiralê Moabê
Balakê lawê Tsîppor ji min re
şand û got: 11 A vay, netewa ku ji
Misirê derketiye wecê welat dadi-
grin; niha were, bona min naletê
lê bike, dibe ku ez ê hêz bînim
ku pê re cengê bikim û wê biqe-
wirînim! 12 Û Xwedê ji Balam re
got: Tuyê bi wan re neçe û naletê li
wê netewê neke; ji ber ku pîroz e!
13 Û Balam sibehê rabû û ji se-
rokên Balak re got: Herin welatê
xwe; ji ber XUDAN naxwaze bona
ku ez bi we re herim emir bide!
14 Û serokên Moab rabûn û çûn û
ji Balak re gotin: Balam nexwest
ku bi me re were!
15 Û dîsa Balak, serokên ji wan zê-
detir û birêztir şandin. 16 Û hatin
cem Balam û jê re gotin: Balakê
lawê Tsîppor wusa dibêje: Ez rica
dikim, bona ku tu were cem min,
bila tu tişt nebe astengiya te; 17 ji
ber ku ez ê bi zêdeyî pêşkêşiyê ji te
re bikim û tu çi ji min re bibêje ez
ê giştikî bikim; niha ez rica dikim,
bo min were û naletê li vê netewê
bike! 18 Û Balam bersivê da û ji
qûlên Balak re got: Ger Balak mala
xwe bi zêr û zîv tijî bide min jî,
dixwaze bila biçûk be, an jî mezin
be, bona kirina tiştekî ez nikarim
ji gotina Xwedayê xwe XUDAN
ve wêdetir herim! 19 Û niha rica
dikim hûn jî îşev li vir bimînin û ka
dê XUDAN hîn çi ji min re bibêje
ez binêrim! 20 Û Xwedê şev hate
cem Balam û jê re got: Ger van zi-
laman bona bang kirina te hatibin,
rabe û bi wan re here; lê tiştê ku ez
ê ji te re bibêjim tuyê bike!

*Kerê Balam*

2.Pêt 2,15-16

21 Û Balam sibehê rabû û kurtanê
kerê xwe girê da û tevî serokên
Moabê çû. 22 Û ji ber ku çû, hêr-
sa Xwedê sor bû û milyaketê XU-
DAN bona ku li dijî wî bisekine
li ser rê çik sekinî. Û ew li kerê
siwar bûbû û du xulamê wî pê re
bûn. 23 Û ker, milyaketê XUDAN
yê ku şûrê wî yê tazî di destê wî
de û di rê de çik sekiniye dît û ker
ji rê derket û ket nav zeviyê û Ba-
lam, bona ku vegerîne rê, li ker
xist. 24 Û milyaketê XUDAN, di
nav rezan de di rêyekî teng de se-
kinî û li vî alî dîwar û li aliyê din
dîwar hebû. 25 Û ker milyaketê
XUDAN dît û di dîwêr de asê bû û
lingê Balam di dîwêr de çewitand
û dîsa li kerê xist. 26 Û milyaketê
XUDAN pêşve çû û li cîhekî teng,
yê tê de bona rast û çepê çewt bûnê
rê nîne sekinî. 27 Û ker milyaketê

XUDAN dît û di bin Balam de me-
rixî û hêrsa Balam sor bû û bi çoyê
xwe li kerê xist. 28 Û XUDAN
devê kerê vekir û ew ji Balam re
got: Ma min çi ji te re kiriye ku
te bi vî awayî sê carî li min xist?
29 Û Balam ji kerê re got: Ji ber ku
te qerfên xwe bi min re kir; xwezî-
ka şûrek di destê min de ba, niha
min ê te bikuşta! 30 Û ker ji Balam
re got: Ma kerê ku di hemûya te-
mena xwe de heta îroj tu lê siwar
bûyî ne ez im? Qet tu carî wusa bi
te dikirim? Û wî got: Na!
31 Û XUDAN çavên Balam vekir û
milyaketê XUDAN, şûrê wî yî tazî
di dest de, di rê de çik sekinî dît û
serê xwe xwar kir û bi ser rû ve ket.
32 Û milyaketê XUDAN jê re got:
Ma çima te wusa sê carî li kerê xwe
xist? A vay, ez bona ku li dijî te bise-
kinim derketim; ji ber ku li ber min
rêya te dibe helaqê 33 û ker min dît
û ev sê car e ji ber min çewt bû; ger
ji ber min çewt nebûba, rastî niha
min ê te kuştiba û wî sax hiştibama!
34 Û Balam ji milyaketê XUDAN
re got: Sûc kirim, ji ber nizanîbûm
ku tu li dijî min di rê de sekiniye û
niha, ger di çavê te de xerab be, ez ê
vegerim mala xwe. 35 Û milyaketê
XUDAN ji Balam re got: Bi van
zilaman re here; lê belê tuyê tenê
gotina ku ji te re bibêjim bibêje. Û
Balam tevî serokên Balak çû.
36 Û dema Balak bihîst ku Balam
tê, bona pêrgîniya wî derket bajarê
Moabê ya ku li sînora Arnonê, li
serê sînorê ye. 37 Û Balak ji Ba-
lam re got: Ma bona bang kirina te
xisûsî zilaman neşandim? Çima tu
nehat cem min? Rastî, qey ez nika-
rim pêşkêşiyê ji te re bikim? 38 Û
Balam ji Balak re got: A vay, ez ji
te re hatim; ya niha, gelo ez dika-
rim tiştekî bibêjim? Gotina ku dê
Xwedê bixe devê min ez ê bibêjim!
39 Û Balam tevî Balak çû û hatin
Kîryat-Hûtsotê. 40 Û Balak dewar
û mîhan qurban kirin û ji Balam re
û ji serokên pê re ne re şandin.
41 Û wusa bû ku, sibehê Balak,
Balam girt û wî hilkişand cîhên
bilind yên Baal û ji wir nîçika
dawîn ya netewê dît.

*Belavoka yekemîn ya Balam*

5.Mûs 23,3-5; Cihû 11

23 Û Balam ji Balak re got:
Li vir ji min re heft heb
pêşkêşîgeh çêbike û li vir bona
min heft heb ganêr û heft heb
beranî amade bikin. 2 Û Balak
mîna ku Balam gotiye kir û Ba-
lak û Balam li her pêşkêşîgehê
ganêrekî û beranekî pêşkêş kirin.
3 Û Balam ji Balak re got: Tu li
cem pêşkêşiya xwe yî şewitandinê
çik bisekine û ez herim; dibe ku,
XUDAN bona pêrgîniya min were
û ya ku nîşanî min bide her çi be,
ez ê ji te re bighînim. Û ew çû

---
1 Tazî.

girekî rût[1]. 4 Û Xwedê pêrgîniya
Balam kir û Balam jê re got: Heft
heb pêşkêşîgeh amade kirim û li
her pêşkêşîgehekê ganêrekî û be-
ranekî pêşkêş kirim. 5 Û XUDAN
gotinekê xist devê Balam û got:
Vegere cem Balak û tuyê wusa
bibêje. 6 Û vegeriya cem wî û a
vay, ew û hemû serokên Moab li
cem pêşkêşiya wî yî şewitandinê
sekinîbûn. 7 Û dest bi metheloka
xwe kir û got:
Balak min ji Aramê, qiralê Moa-
bê min ji çiyayê rojhilatê ve anî:
Were bo min naletê li Aqûp bike!
Û: Were nifira li Îsraêlê bike! got.
8 Ma ji ya ku XUDAN naletê lê
nekiriye, ez ê çawa naletê bikim?
Û ji ya ku Xwedê nifira lê nekiri-
ye, ez ê çawa nifir bikim? 9 Ji ber
ku ji sertapa çiyayan wî dibînim
û ji giran wî temaşe dikim; a vay,
neteweyek bi cudayî rûniştiyî ye
û dê di nav neteweyan de neyê ji-
martin. 10 Ma kî dikare toza Aqûp
bijmêre û ji çarê yekê Îsraêlê bi-
hesibîne? Bila canê min bi mirina
salihan bimire û bila dawiya min
bibe mîna ya wî!
11 Û Balak ji Balam re got: Te çi
bi min kir? Te bona ku naletê li
neyarên min ve bikî anîm û a vay,
lê te wan pîroz kir! 12 Û bersivê
da û got: Ma hewce nake qey ez
balkêşiyê li ya ku XUDAN xisti-
ye devê min bikim?

*Belavoka duwemîn ya Balam*

5.Mûs 33,26-29

13 Û Balak jê re got: Ez rica di-
kim, bi min re were cîhekî din,
tuyê ji wir wan bibîne; lê tuyê
nîçika wan bibîne û tuyê giştika
wan nebîne û li wir bona min
naletê li wan bike! 14 Û wî bir
beyara Tsofîmê, girê Pîsgayê û
heft pêşkêşîgehê çêkir û li her
pêşkêşîgehê ganêrekî û beranekî
pêşkêş kirin. 15 Û ji Balak re got:
Li vir, li cem pêşkêşîgeha xwe yî
şewitandinê bisekine û ez li wir,
pêrgîniyê li XUDAN bikim. 16 Û
XUDAN pêrgîniyê li Balam kir û
gotinekê xist devê wî û got: Ve-
gere cem Balak û tuyê wusa bi-
bêje! 17 Û hate cem wî û a vay,
ew û tevî wî serokên Moabê li
cem pêşkêşiya wî yî şewitandinê
sekinîbûn. Û Balak jê re got: XU-
DAN çi got? 18 Û dest bi methe-
loka xwe kir û got:
Ya Balak, rabe û guhdarî bike!
Ya lawê Tsîppor, guh bide min!
19 Xwedê ne mirov e ku de-
rew bibêje û ne lawê mirov e ku
poşman bibe; ew dema bibêje qey
wê nake? An jî dema soz bide, qey
nayne cîh? 20 A vay, bona ku pîroz
bikim emir stendim û wî pîroz kir
û ez nikarim şunda vegerînim.
21 Di Aqûp de fesadiyê nedît. Û
di Îsraêlê de neheqiyê nedît, Xwe-
dayê wî XUDAN bi wî re ye û di

nav wan de çepika mexsûsî qiral
heye. 22 Xwedê wan ji Misirê ve
derdixîne; mîna gayê kovî quweta
wî heye. 23 Rastî di Aqûp de sêr-
bazî nîne û li Îsraêlê falbazî nîne;
niha dê di derheqê Aqûp û Îsraêl
de: Ka Xwedê çi çêkir! bête gotin.
24 A vay, netewe mîna şêra mê ra-
dibin û xwe mîna şêrekî radikin;
heta ku nêçîra xwe bixwe û xwîna
yên ku hatine kuştin venexwe, dê
ranekeve!
25 Û Balak ji Balam re got: Qet
naletê li wan neke, lê belê wan
pîroz jî neke. 26 Lê belê Balam
bersivê da Balak û got: Ma ji te re
negotim, XUDAN çi gotibe hew-
ce dike ku ez wan bikim?

*Belavoka sêwemîn ya Balam*

27 Û Balak ji Balam re got: Ez
rica dikim, were ku ez te bibim
cîhekî din; dibe ku di çavê Xwe-
dê de xweş bête xuyanîbûn û tu li
wir bona min naletê li wan bike!
28 Û Balak Balam bir girê Peorê
ya ku li çolê dinihêre. 29 Û Ba-
lam ji Balak re got: Li vir ji min re
heft heb pêşkêşîgeh çêbike û li vir
bona min heft heb ganêrê ciwan û
heft heb beran amade bikin. 30 Û
Balak mîna ku Balam gotiye kir
û di her pêşkêşîgehê de gayekî û
beranekî pêşkêş kir.

24 Û dema Balam dît ku pîroz
kirina Îsraêlê di çavê XU-
DAN de qenc e, mîna carên din
neçû ku li nîşanan bigere, lê belê
wecê xwe berbi çolê ve zivirand.
2 Û Balam çavên xwe rakir û dît ku
Îsraêl li gor ezbetên xwe rûniştiye
û Ruhê Xwedê hate ser wî. 3 Û
dest bi metheloka xwe kir û got:
Balamê lawê Beor dibêje û zilamê
ku çavê wî vebûye dibêje:
4 Zilamê ku gotina Xwedê bihîs-
tiye, zilamê ku bi ketinê û bi çav
vekirî, xewn û xeyala Şiyandarê[1]
xwe dîtiye dibêje: 5 Ya Aqûp, ça-
dirên te, ya Îsraêl, şunwarên te çi
xweşik in! 6 Mîna newalan belav
bûne, mîna baxçeyên li kêleka
çem in, mîna darên talîjariyê yên
ku XUDAN danîne, mîna darên
serwîzadê yên ku li qeraxa avê ne!
7 Dê ji sîtilên wan av biherike û
nîjada wî dê di pirr avan de bin û
dê qiralê wî ji Agag biqamtir[2] be û
dê qiraletiya wî bête bilind kirin.
8 Xwedê wî ji Misirê ve derdixe;
mîna gayê kov quweta wî heye; dê
netewê ku jê re bûne neyar bixwin
û hestiyên wan bişkîne û bi tîrên
xwe ve wan qul bike. 9 Li ser çon-
ga daket, mîna şêrekî raket û mîna
şêra mê, dê kî wî rake? Yê ku te
pîroz kiriye, bila pîroz be û yê ku
naletê li te bike, bila bi nalet be!
10 Û hêrsa Balak li dijî Balam sor

[1] An jî: Yê ku Hêza Xwe têra her tiştî dike.

[2] Dirêjtir.

bû û destên xwe li hev xistin û
Balak ji Balam re got: Bona ku tu
naletê li neyarên min bike bangî
te kirim û a vay, ev sê car e ku, tu
wan pîroz dike! 11 Û niha, bire-
ve cîhê xwe; min gotibû ez ê zehf
pêşkêşiyê ji te re bikim û a vay,
XUDAN te ji pêşkêşiyê mehrûm
kir. 12 Û Balam ji Balak re got:
Ger Balak mala xwe bi zîv û zêr
ve tijî bide min jî ez ji xwe, bona
ku qenciyê an jî xerabiyê bikim ji
gotina XUDAN wêdetir nakim;
13 Ma ji şandiyên ku te ji min re
şandin re jî negotim, XUDAN çi
bibêje ez ê wê bibêjim? 14 Û niha
a vay, ez diçim netewa xwe; were,
ka dê ev netewe di rojên dawîn de
çi ji netewa te re bikin ez agahiyî
te bikim[1].

*Belavoka çaremîn ya Balam*

15 Û dest bi metheloka xwe kir û
got: Balamê lawê Beor dibêje û
zilamê ku çavê wî vebûye dibêje;
16 yê ku gotinê Xwedê dibihîze û
zanîna yê ku Bilind e dizane, yê
ku bi ketinê û bi çav vekirî, yê ku
xewn û xeyala Şiyandar dîtiye,
dibêje:
17 Ez wî dibînim, lê belê ne niha;
ez lê dinihêrim, lê belê ne nêzîk e;
dê ji Aqûp sitêrkek derkeve û dê
ji Îsraêlê gopalek[2] rabe, dê ji seri-
yekî heta seriyê din li Moab bixe
û bişkîne û dê hemûyên lawên şer
bieciqînin. 18 Û neyarê wê, Edom,
dê bibe milk, dê Seîr jî bibe milk
û dê Îsraêl karekî biqudret çêbike.
19 Û dê yekî ji nîjada Aqûp ser-
weriyê bajo û reha bermayî dê ji
bajêr ve bibire.

*Belavokên dawîn yên Balam*

20 Û Amalek dît û dest bi methe-
loka xwe kir û got: Amalek pêşiya
neteweyan bû; lê belê dê dawiya
wê here helaqê. 21 Û Kenî dît û
dest bi metheloka xwe kir û got:
Şunwara te xwurt e û hêlîna te di
hundirê zinarê de hatiye danîn.
22 Heta ku Asûr te sirgûn bike, dê
Keniyî xerab bibin. 23 Û dest bi
metheloka xwe kir û got:
Ax! Dema Xwedê vêya bike, dê
kî bijî? 24 Û dê ji berava Kîttîmê
keştî werin û dê Asûr nizm bikin
û dê Eber nizm bikin û dê ew jî
biçe helaqê.
25 Û Balam rabû û çû û vegeriya
cîhê xwe û Balak jî di rêya xwe
de çû.

*Îsraêlî li Peorê gunehê dikin*

Pey 2,14; 5.Mûs 4,3-4; 1.Kor 10,8;
Zeb 106,28-31

25 Û Îsraêl li Şîttîmê rûniştû netewe dest pê kir û bi
qîzên Moab re zinê kir 2 û bona
qurbanên îlahên xwe bangî ne-

1 An jî: Ez ji te re bêjim.

2 Asayek.

tewê kirin û netewe xwarin û ji
îlahên wan re xwar bûn. 3 Û Îs-
raêl bi Baal-Peor ve hate girêdan
û hêrsa XUDAN li dijî Îsraêlê
sor bû. 4 Û XUDAN ji Mûsa re
got: Hemû serokên netewê bigre
û bona ku hêrsa sor ya XUDAN
ji Îsraêlê vegere, wan li hemberî
rojê li ber XUDAN daliqîne. 5 Û
Mûsa ji serwerên Îsraêlê re got:
Hûn her yek zilamên xwe, yên
ku bi Baal-Peor ve hatine girêdan
bukujin!
6 Û a vay, ji lawên Îsraêl zilamek
hat, li ber çavê Mûsa û li ber çavê
civaka hemûyên lawên Îsraêl yên
li ber deriyê Çadira Civandinê de
digiriyan pîrekek Midyanî ji bi-
rayên xwe re anî. 7 Û dema Pî-
nehasê[1] lawê Eleazarê lawê kahîn
Harûn vêya dît, ji nav civakê ve
rabû û rimekî girt destê xwe 8 û
li pêy yê bi Îsraêlî ve ket û ket ça-
dirê û rima xwe bi her duyan ve
çikand. Rim him zikê yê Îsraêlî û
him jî ya pîreka Midyanî qul kir û
ji aliyê din ve derket. Bi vî awayî
nexweşiya ku Îsraêlê tune dike aş
bû. 9 Yên ku di webayê de mi-
ribûn bîst û çar hezar kes bûn.
10 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 11 Pînehasê lawê Eleazarê
lawê kahîn Harûn di nav lawên Îs-
raêl de çavnebartiyê li çavnebari-
ya min kir û xezeba min ji ser wan
ve vegerand û min di çavnebariya
xwe de lawên Îsraêl telef nekirin.
12 Bo vê yekê bibêje: A vay, ez
peymana xweşiyê didim wî 13 û
dê bona wî û li pêy wî bona nî-
jada wî dê peymana kahîntiyê ya
abadîn bibe; ji ber ku bona Xwe-
dayê xwe bû çavnebar û bona
lawên Îsraêl kefaretê kir.
14 Û navê zilamê Îsraêlî yê ku
bi pîreka Midyanî re hate lêxis-
tin Zîmriyê lawê Salû bû, di
nava Şîmeûniyan de begekî mala
bapîran bû. 15 Û navê pîreka Mid-
yanî ya hate lêxistin Kozbiya qîza
Tsûr bû û ev zilam li Midyanê se-
rokekî mala bapîran bû.
16 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 17 Zorê bide Midyaniyan û li
wan bixe; 18 ji ber ku ew di bûyera
Peorê de û çawa ku li paşiya vêya
xwuşka wan ya ku di roja webayê
de hatiye lêxistin, di bûyera Kozbî
ya qîza serekê Mîdyanî de, bi da-
fikên ku danîne we xapandin û bi
neyarî li we tev geriyan.

### *Jimartina Duwemîn*

4.Mûs 1; 1.Dîr 2-8; Pey 7,4-8

26 Û wusa bû ku, paşî webayê,
XUDAN bi Mûsa û Elea-
zarê lawê kahîn Harûn re axifî û
got: 2 Civaka hemû lawên Îsraêl,
li gor malên bapîrên xwe, yên
ku bîst salî ne û jê berjortir in,
hemûyên ku ji Îsraêlê derdikevin
cengê, giştikan bigirin. 3 Û Mûsa

[1] An jî: Kahîn Fînehas.

û kahîn Eleazar, li cem Urdunê, li
hemberî Erîhayê, di zozanên Moa-
bê de bi wan re axifîn û gotin: 4
Mîna ku XUDAN emir daye Mûsa
û lawên Îsraêl yên ku ji welatê Mi-
sirê ve derketine, giştikên bîst salî
û jê berjortir in bigirin.
5 Yekemînê Îsraêlê Rûben; lawên
Rûben: Ji Henox, eşîra Henoxiyan;
ji Pallû, eşîra Pallûiyan; 6 ji Hets-
ron, eşîra Hetsroniyan; ji Karmî,
eşîra Karmiyan. 7 Eşîrên Rûbeni-
yan vana ne û yên ku ji wan hatine
jimartin çel û sê hezar û heft sed û
sîh kes bûn. 8 Û lawê Pallû Elîab
9 û lawên Elîab: Nemûel û Datan
û Abîram. Pêşhatiyên civakê ên
ku di civaka Korah de li dijî XU-
DAN ketine keftûleftê, ev Datan û
Abîram in 10 û dema ev civak mir
û agir du sed û pêncî kesî xwar û
qedand erd devê xwe vekir û wan,
tevî Korah daqurtand û bûn fêre[1].
11 Lê belê lawên Korah nemirin.
12 Û li gor eşîrên xwe lawên
Şîmeûn: Ji Nemûel, eşîra Nemûe-
liyan; ji Yamîn, eşîra Yamîniyan; ji
Yakîn, eşîra Yakîniyan; 13 ji Zerah,
eşîra Zerahiyan; ji Şaûl, eşîra
Şaûliyan. 14 Eşîrên Şîmeûniyan
vana ne, bîst û du hezar û du sed.
15 Li gor eşîrên xwe lawên Gad:
Ji Tsefon, eşîra Tsefoniyan; ji
Haggî, eşîra Haggiyan; ji Şûnî,
eşîra Şûniyan; 16 ji Oznî, eşîra
Ozniyan; ji Erî, eşîra Eriyan, 17 ji
Arod, eşîra Arodiyan, ji Arelî, eşîra
Areliyan. 18 Ji lawên Gad li gor
yên ku hatine jimartin eşîrên wan
vana ne, çel hezar û pênc sed.
19 Lawên Cihûda: Er û Onan û Er û
Onan li welatê Kenanê mirin. 20 Û
li gor eşîrên xwe lawên Cihûda: Ji
Şela, eşîra Şelaniyan; ji Pêrez, eşîra
Pêreziyan; ji Zerah, eşîra Zerahiyan
bûn. 21 Û lawên Perets: Ji Hetsron,
eşîra Hetsroniyan; ji Hamûl, eşîra
Hamûliyan, 22 ji wan li gor yên ku
hatine jimartin eşîrên Cihûda vana
ne, heftê û şeş hezar û pênc sed.
23 Li gor eşîrên wan lawên
Îssakar: Ji Tola, eşîra Tolaiyan;
ji Pûva, eşîra Pûvaniyan; 24 ji
Yaşûb, eşîra Yaşûbiyan; ji Şîmron,
eşîra Şîmroniyan. 25 Li gor yên
ku ji Îssakar ve hatine jimartin
eşîrên wan vana ne, şêst û çar he-
zar û sê sed.
26 Li gor eşîrên wan lawên Ze-
bûlûn: Ji Sered, eşîra Serediyan;
ji Elon, eşîra Eloniyan; ji Yahleel,
eşîra Yahleeliyan. 27 Li gor yên
ku ji Zebûlûn ve hatine jimartin
eşîrên wan vana ne, şêst hezar û
pênc sed.
28 Li gor eşîrên wan lawên Ûsiv:
Manaşşe û Efrayîm. 29 Lawên
Manaşşe: Ji Makîr, eşîra Makîriyan
û Makîr bû bavê Gîlead; ji Gîlead,
eşîra Gîleadiyan. 30 Lawên Gîlead
vana ne: Ji Iyezer, eşîra Iyezeriyan;
ji Helek, eşîra Helekiyan 31 û ji

1 Îbret.

Asrîel, eşîra Asrîeliyan û ji Şekem,
eşîra Şekemiyan 32 û ji Şemîda,
eşîra Şemîdaiyan û ji Hefer, eşîra
Heferiyan. 33 Û lawê Tselofhadê
lawê Hefer tunebû, lê qîzên wî he-
bûn û navên qîzên Tselofhad Mah-
la û Noa, Hogla, Mîlka û Tîrtsa bû.
34 Eşîrên Manaşşe vana ne û yên
ku ji van hatine jimartin, pêncî û
du hezar û heft sed kes bûn.
35 Li gor eşîrên wan lawên
Efrayîm vana ne: Ji Şûtelah, eşîra
Şûtelahiyan; ji Beker, eşîra Beke-
riyan; ji Tahan, eşîra Tahaniyan.
36 Û lawên Şûtelah vana ne: Ji
Eran, eşîra Eraniyan. 37 Li gor
yên ku ji lawên Efrayîm ve hatine
jimartin eşîrên wan vana ne, sîh û
du hezar û pênc sed kes. Li gor
eşîrên wan lawên Ûsiv ev in.
38 Li gor eşîrên wan lawên Ben-
yamîn: Ji Bela, eşîra Belaiyan; ji
Aşbel, eşîra Aşbeliyan; ji Ahîram,
eşîra Ahîramiyan; 39 ji Şefûfam,
eşîra Şûfamiyan; ji Hûfam, eşîra
Hûfamiyan. 40 Û lawên Bela Ard
û Naaman bûn: Ji Ardan, eşîra Ar-
dayiyan; ji Naaman, eşîra Naama-
niyan. 41 Li gor eşîrên xwe lawên
Benyamîn vana ne û yên ku ji wan
hatine jimartin, çel û pênc hezar û
şeş sed bûn.
42 Li gor eşîrên wan lawên Dan
vana ne: Ji Şûham, eşîra Şûha-
miyan. Li gor eşîrên xwe eşîrên Dan
vana ne. 43 Hemû Şûhamiyan li gor
yên ku hatine jimartin, eşîrên wan,
şêst û çar hezar û çar sed kes bûn.
44 Li gor eşîrên wan lawên Aşer:
Ji Yîmna, eşîra Yîmniyan; ji
Yîşvî, eşîra Yîşviyan; ji Berîa,
eşîra Berîiyan. 45 Ji lawên Berîa:
Ji Heber, eşîra Heberiyan; ji
Malkîel, eşîra Malkîeliyan. 46 Û
navê qîza Aşer Serah bû. 47 Li gor
yên ku ji lawên Aşer ve hatine ji-
martin eşîrên wan vana ne; pêncî
û sê hezar û çar sed.
48 Li gor eşîrên wan lawên
Naftalî: Ji Yahtseel, eşîra Yahtsee-
liyan; ji Gûnî, eşîra Gûniyan; 49 ji
Yetser, eşîra Yetseriyan; ji Şîllem,
eşîra Şîllemiyan. 50 Li gor eşîrên
xwe eşîrên Naftalî vana ne û yên
ku ji wan hatine jimartin, çel û
pênc hezar û çar sed kes bûn.
51 Ji lawên Îsraêl yên ku hatine
jimartin vana ne, şeş sed û yek he-
zar û heft sed û sîh.
52 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 53 Li gor hejmara navan
dê welêt ji van re bi mêrasî bête
par kirin. 54 Tuyê ji yê ku zêdeyî
mêrasê zêde bike û ji yê ku hindik
e kêm bike; dê li gor yên ku jê ha-
tine jimartin mêrasa her yekî bide
dayîn. 55 Lê dê welat bi pişkê ve
bête parve kirin; dê bavên wan li
gor navên ezbetên xwe mêrasê bi-
girin. 56 Di navbera yên ku zêde
û yên ku kêm de, mêrasên wan dê
li gor pişkê bête parve kirin.
57 Li gor eşîrên wan yên ku ji
Lêwî hatine jimartin vana ne:

Ji Gerşon, eşîra Gerşoniyan; ji
Kohat, eşîra Kohatiyan; ji Merarî,
eşîra Merariyan. 58 Eşîrên Lêwî
vana ne: Eşîra Lîbniyan, eşîra
Hebroniyan, eşîra Mahliyan;
eşîra Mûşiyan, eşîra Korahiyan.
Û Kohat bû bavê Amram.
59 Û navê jina Amram, qîza Lêwî
Yokebed bû; li Misirê ji Lêwî
re hate dinê û Harûn û Mûsa û
xwuşka wan Mîryam ji Amram re
anîn dinê. 60 Û ji Harûn re Nadab
û Abîhû, Eleazar û Îtamar hatin
dinê. 61 Û dema Nadab û Abîhû
li ber XUDAN agirê biyan pêşkêş
kirin, mirin. 62 Û yên ku ji wan
hatine jimartin, yên yek mehî û jê
berjortir, wekî ku gişt mêr bin, bîst
û sê hezar kes bûn; ji ber ku di nav
lawên Îsraêl de nehatin jimartin, ji
ber ku di nav lawên Îsaraêlê de ji
wan re mêras nehat dayîn.
63 Yên ku ji aliyê Mûsa û kahîn
Eleazar ve hatine jimartin vana ne;
wan lawên Îsraêl, li cem Urdunê, li
hemberî Erîhayê, di zozanên Moa-
bê de jimartin. 64 Lê belê ji lawên
Îsraêl yên ku Mûsa û kahîn Harûn
li çola Sînayê jimartine, tu kes di
nav van ên ku hatine jimartin de
tune bûn. 65 Ji ber ku XUDAN di
derheqê wan de: Dê muheqeq li
çolê bimirin! gotibû. Û ji wan xey-
nî Kalebê lawê Yefûnne û Yêşûyê
lawê Nûn tu kes nemabûn.

### *Qîzên Tselofhad*

4.Mûs 36; Yêşû 17,3-4

27 Ji eşîrên Manaşşeyê lawê
Ûsiv, qîzên Tselofhadê
lawê Heferê, lawê Gîleadê, lawê
Makîrê, lawê Manaşşe, nêzîk
hatin û navên qîzên wî vana ne:
Mahla, Noa û Hogla û Mîlka û
Tîrtsa. 2 Û li ber Mûsa û li ber
kahîn Eleazar û li ber began û
hemûya civakê, di deriyê Çadira
Civandinê de sekinîn û gotin: 3
Bavê me li çolê mir û ne di nava
civaka ku di civaka Korahê li dijî
XUDAN civiyane de bû; lê belê di
sûcê xwe de mir û lawên wî tune
bûn. 4 Ma ji ber ku lawê wî nîne,
dê çima navê bavê me ji nav eşîra
wî bête rakirin? Di nav birayên
bavê me de milkekî bidin me! 5 Û
Mûsa doza wan bir ber XUDAN.
6 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 7 Qîzên Tselofhad rast
dibêjin; muheqeq tuyê di nav bi-
rayên bavên wan de wekî milk be,
mêrasê bide wan û tuyê mêrasa
bavê wan derbasî aliyê wan bike[1].
8 Û tuyê bi lawên Îsraêl re biaxi-
fe û bibêje: Ger zilamek bimire û
lawê wî tune be, wê gavê hûn ê
mêrasa wî derbasî qîza wî bikin.
9 Û ger qîza wî tune be, wê gavê
hûn ê mêrasa wî bidin birayên wî.
10 Û ger birayên wî tunebin, wê
gavê hûn ê mêrasa wî bidin bi-

---

1 Bide wan, an jî: Neqlî wan bike.

2 An jî: Yê herî pêştir e.

rayên bavê wî. 11 Û ger birayên
bavê wî tunebin, wê gavê hûn ê
mêrasa wî bidin ji eşîra wî merivê
wî yî herî nêzîk[2] e û dê bibe milkê
wî û mîna ku XUDAN emir daye
Mûsa, dê ji lawên Îsraêl re bibe
zagon û darazî.

*Dê Yêşû cîhê Mûsa bigire*

5.Mûs 31,7-23; 32,48-52; 34,1-9

12 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Hilkişe vî çiyayê Abarîmê û
welatê ku dayîme lawên Îsraêl bi-
bîne. 13 Û paşî ku tu wê bibînî,
çawa birayê te Harûn beşdarî
netewa xwe bûye, tuyê jî beşdar
bibe; 14 ji ber ku li çola Tsînê di
derba keftûlefta netewê de, we li
dijî emrê min ya ku li ber çavên
wan di avê de pîroz kirina min,
serî hildan. (Vana li çola Tsînê li
Kadeşê avên Merîba ne.)
15 Û Mûsa bi XUDAN re axifî û
got: 16 XUDAN, Xwedayê ruhên
hemû mirovan, bila zilamekî li ser
neteweyê wezîfedar bike, 17 ew jî li
ber wan derkeve û li ber wan bike-
ve û wan bînin derve û wan bînin
hundir; da ku, bila civaka XUDAN
nebe mîna mîhên bê şivan.
18 Û XUDAN ji Mûsa re got:
Yêşûyê lawê Nûn bigire cem xwe,
zilamekî ku tê de Ruh[1] heye û tuyê
destê xwe deyne ser wî 19 û tuyê wî
li ber kahîn Eleazar û li ber hemûya
civakê bisekinîne û li ber çavên
hemûya civaka Îsraêlê tuyê talîmatê
bide. 20 Û bona ku hemûya civaka
lawên Îsraêl îtaetê jê re bikin, tuyê
ji şerefa[2] xwe deyne ser wî. 21 Û
dê li ber kahîn Eleazar bisekine,
ew jî dê li ber XUDAN bi daraziya
Ûrîmê bona wî bipirse; ew û tevî wî
hemûyên lawên Îsraêl, hemûya ci-
vakê dê bi gotina wî derkevin derve
û bi gotina wî bikevin hundir. 22 Û
Mûsa, li gor ku XUDAN emir daye
wî kir û Yêşû girt û wî li ber kahîn
Eleazar û hemûya civakê sekinand
23 û mîna ku XUDAN bi navdîtiya
Mûsa emir daye destê xwe danî ser
wî û talîmatê dayê.

*Pêşkêşiya Rojane*

2.Mûs 29,38-42; Hêz 46,13-15

28 Û XUDAN bi Mûsa re axifî
û got: 2 Emir bide lawên Îs-
raêl û ji wan re bibêje: Hûn ê bala
xwe bidinê ku pêşkêşiya ji min re
ye, wekî ji min re bêhnxweşî be,
xwarina minî pêşkêşiyên bi agir
ve tên kirin, di demên eşkere de
pêşkêşî min bikin. 3 Û tuyê ji wan
re bibêje: Pêşkêşiya di agir de tête
çêkirin, ya ku hûn ê pêşkêşî XU-
DAN bikin ev e: Wekî pêşkêşiya
şewitandinê ya her timî be, li gor
wekî her roj du serî be, berxikên
nêr yên yek salî ên bêqisûr. 4 Tuyê
ji berxikan yekî sibê pêşkêş bike

---

[1] An jî: ...tê de Ruhê XUDAN heye.

[2] Raye, selahiyet, an jî: Sawêr.

û ya din ber êvarî pêşkêş bike 5 û
wekî pêşkêşiya nan be, tuyê ji deh
pariyê efa pariyek arvanê zirav ya
ku bi zeyta zeytûnê ve hatiye ku-
tandin, ya ku ji çar pariyên hînê pa-
riyekî ye hatiye sitirandin pêşkêş
bike. 6 Pêşkêşiya ku her timî tête
şewitandin e, ya ku li çiyayê Sînayê
mezrandî ye, wekî bêhnxweşî be,
pêşkêşiya ku bi agir ve ji XUDAN
re hatiye çêkirin e. 7 Û pêşkêşiya
wê yî rijandinê, dê bona berxikekê
ji çar pariyê hînê pariyek be; tuyê li
cîhê pîroz ji XUDAN re, ji vexwa-
rinê pêşkêşiyekê dirije birijîne. 8 Û
tuyê berxika din ber êvarê pêşkêş
bike; sibehê mîna pêşkêşiya nan
û wekî pêşkêşiya wê yî rijandinê,
tuyê wê mîna pêşkêşiya ku bi agir
ve tête çêkirin, wekî ku ji XUDAN
re bêhnxweşî bibe pêşkêş bike.

*Pêşkêşiyên Roja Sebtê*

9 Û di roja Sebtê de, du berxikên
nêr ên yeksalî yên bêqisûr û wekî
pêşkêşiya nan be, ji deh pariyê efa-
yê du parî arvanê zirav ê ku bi rûn
ve hatiye sitirandin û pêşkêşiya
wê yî rijandinê, dê bête pêşkêş ki-
rin; 10 xeynî pêşkêşiya ku her timî
tête şewitandin û pêşkêşiya wê yî
rijandinê, pêşkêşiya şewitandinê
ya her Sebtê ev e.

*Pêşkêşiyên Heyva nû*

11 Û di serê mehên we de, ji XU-
DAN re wekî ku bibin pêşkêşiya
şewitandinê, du ganêrên ciwan û
beranek û yek salî heft berxikên
nêr yên bêqisûr 12 û bona her
ganêrî wekî pêşkêşiya nan be, ji
deh pariyê efayê sê parî arvanê
zirav ê ku bi rûn ve hatiye siti-
randin û bona yek beranî, ji deh
pariyê efayê du parî arvanê zirav
ê ku bi rûn ve hatiye sitirandin
13 û bona her berxikî, ji deh pari-
yê efayê pariyek arvanê zirav ê ku
bi rûn ve hatiye sitirandin; wekî
pêşkêşiya şewitandinê û bêhn
xweşî be, hûn ê ji XUDAN re
pêşkêşiya ku di agir de tête çêki-
rin pêşkêş bikin. 14 Û pêşkêşiyên
wanî rijandinê, dê bona ganêrekî
nîv hîn û bona beran ji sê pariyên
hînê pariyekî û bona berxikê ji çar
pariyên hînê pariyekî xemr be; ji
mehên salê pêşkêşiya şewitandinê
ya her mehê ev e. 15 Xeynî
pêşkêşiya şewitandinê ya her timî
û pêşkêşiya wê yî rijandinê, dê ji
XUDAN re, wekî pêşkêşiya sûcê
be nêriyek bête pêşkêşî kirin.

*Pêşkêşiyên Fisihê*

16 Û Fisiha XUDAN di meha
yekemîn de, di roja çardehê mehê
de ye. 17 Û dê di roja panzdehên
vê mehê de bibe cejn; dê heft roj
nanê bêhavên were xwarin. 18 Dê
di roja yekemîn de civaka pîroz
bibe; hûn ê qet tu karê giran ne-
kin; 19 wekî pêşkêşiya ku bi agir
ve tête çêkirin, pêşkêşiya ku ji

XUDAN re tête şewitandin be,
hûn ê du ganêrên ciwan û beranek
û yek salî heft berxikên nêr pêşkêş
bikin; dê ew bona we bêqisûr bin
20 û wekî pêşkêşiya wanî nan be;
bona ganêrekî ji dehê sisê û bona
beran ji dehê dudo arvanê zirav ya
ku bi rûn ve hatiye sitirandin hûn
ê pêşkêş bikin; 21 ji heft berxikî
bona her berxikî ji dehê yek 22 û
ji bo ji we re kefaretê bike, wekî
pêşkêşiya sûcê be hûn ê nêriyekî
pêşkêş bikin. 23 Xeynî pêşkêşiya
şewitandinê ya sibehê ya ku
pêşkêşiya şewitandinê ya her timî
ye, hûn ê vana jî pêşkêş bikin.
24 Bi vî awayî hûn ê her roj, wekî
ku ji XUDAN re bêhnxweşî be,
xwarina pêşkêşiya ku bi agir ve
tête çêkirin heft rojî pêşkêş bikin;
xeynî pêşkêşiya şewitandinê ya
her timî û pêşkêşiya wê yî rijan-
dinê dê bête pêşkêşî kirin. 25 Û di
roja heftemîn de, dê bona we ci-
vîna pîroz bibe; hûn ê qet tu karê
giran nekin.

*Pêşkêşiyên ku dê di Cejna Hefteyan de bêne pêşkêş kirin*

26 Û di roja nûberan de, di cej-
na we yî hefteyan de, dema hûn ji
XUDAN re pêşkêşiya nan ya nû
pêşkêş bikin, dê bona we civîna
pîroz hebe; hûn ê qet tu karê giran
nekin; 27 lê belê wekî ji XUDAN
re bibe bêhnxweşî, bibe pêşkêşiya
şewitandinê, hûn ê du ganêrên
ciwan û beranek û yek salî heft
berxikên nêr 28 û wekî pêşkêşiya
wanî nan be; bona her ganêrekî
ji dehê sisê û bona yek beranî ji
dehê dudo, 29 ji heft berxikî bona
her berxikî ji dehê yek, arvanê
zirav ya ku bi rûn ve hatiye siti-
randin 30 û ji bo ji we re kefaretê
bike hûn ê nêriyekî pêşkêş bikin.
31 Xeynî pêşkêşiya şewitandinê
ya her timî û pêşkêşiya wê yî nan,
hûn ê vana, dê vana bêqisûr bin[1] û
tevî pêşkêşiyên wanî şewitandinê
pêşkêş bikin.

*Roja Borî lêxistinê*

29 Û di meha heftemîn de, di
yekê mehê de dê bona we
civîna pîroz bibe, hûn ê qet tu karê
giran çênekin; dê bona we roja borî
lêxistinê bibe. 2 Û wekî ji XUDAN
re bibe bêhnxweşî, bibe pêşkêşiya
şewitandinê, hûn ê ganêrek ciwan
û beranek û yek salî heft berxikên
nêr ên bêqisûr 3 û wekî pêşkêşiya
wanî nan be; bona ganêr ji dehê
sisê û bona beran ji dehê dudo,
4 ji heft berxikî bona her berxikî ji
dehê yek, arvanê zirav ya ku bi rûn
ve hatiye sitirandin 5 û ji bo ji we
re kefaretê bike, wekî pêşkêşiya
sûcê be, hûn ê nêriyekî pêşkêş
bikin; 6 vana li gor ûsila xwe, wekî
ji XUDAN re bibe bêhnxweşî,
bibe pêşkêşiya ku bi agir ve tête

[1] An jî: Dê vana bona we bêqisûr bin.

çêkirin, ji pêşkêşiya şewitandinê ya meha nû û ji pêşkêşiya wê yî nan û ji pêşkêşiya şewitandinê ya her timî û ji pêşkêşiya wê yî nan û ji pêşkêşiyên wanî rijandinê cihêtir in.

*Pêşkêşiyên ku dê di Roja bexşandina gunehan de bêne pêşkêş kirin*

7 Û di dehê vê meha heftemîn de,
dê bona we civîna pîroz be û hûn
ê nefsên xwe nizm bikin û qet
bi tu cureyî karî nekin; 8 lê belê
wekî bêhnxweşî be, ji XUDAN
re pêşkêşiya şewitandinê be,
hûn ê ganêrek ciwan û beranek û
yek salî heft berxikên nêr pêşkêş
bikin; dê ew bona we bêqisûr bin
9 û wekî pêşkêşiya wanî nan be;
bona ganêr ji dehê sisê û bona
yek beranî ji dehê dudo, 10 ji heft
berxikî bona her berxikî ji dehê
yek, arvanê zirav ya ku bi rûn ve
hatiye sitirandin 11 û ji bo ji we
re kefaretê bike, wekî pêşkêşiya
sûcê be, hûn ê nêriyekî pêşkêş
bikin; vana, ji pêşkêşiya sûc û kefaretê û ji pêşkêşiya şewitandinê ya her timî û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê cihêtir in.
12 Û di roja panzdehê meha heftemîn de, dê bona we civîna pîroz be û hûn ê qet tu karê giran nekin û heft roj ji XUDAN re cejnê
çêbikin 13 û wekî pêşkêşiya
sewitandinê, pêşkêşiya ku bi agir
ve tête çêkirin û wekî ji XUDAN
re bêhnxweşî be, hûn ê sêzdeh
ganêrên ciwan û du beran û yek
salî çardeh berxikên nêr pêşkêş
bikin, dê ev bêqisûr bin 14 û wekî
pêşkêşiya wanî nan be; ji sêzdeh
ganêrî bona her ganêrekî ji dehê
sisê û ji du beranî bona her beranekî ji dehê dudo 15 û ji çardeh
berxikî bona her berxikî ji dehê
yek, arvanê zirav ya ku bi rûn
ve hatiye sitirandin 16 û wekî
pêşkêşiya sûcê be, hûn ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana ji pêşkêşiya şewitandinê ya her timî û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên wê yî rijandinê cihêtir in.
17 Û di roja duwem de, donzdeh ganêrên ciwan û du beran û
yek salî çardeh berxikên nêr ên
bêqisûr 18 û li gor hejmarên wan,
li gor ûsilê bona ganêran, bona beranan û bona berxikan pêşkêşiya nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
19 û wekî pêşkêşiya sûcê be, hûn
ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana, ji pêşkêşiya şewitandinê ya her timî û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên wê yî rijandinê cihêtir in.
20 Û di roja sêwem de, yanzdeh ganêr û du beran û yek salî çardeh berxikên nêr ên bêqisûr
21 û li gor hejmarên wan, li gor ûsilê bona ganêran, bona beranan û bona berxikan pêşkêşiya nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
22 û wekî pêşkêşiya sûcê be, hûn

ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana, ji
pêşkêşiya şewitandinê ya her timî
û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên
wê yî rijandinê cihêtir in.
23 Û di roja çaremîn de, deh ganêr û
du beran û yek salî çardeh berxikên
nêr ên bêqisûr; 24 li gor hejmarên
wan, li gor ûsilê bona ganêran, bona
beranan û bona berxikan pêşkêşiya
nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
25 û wekî pêşkêşiya sûcê be, hûn
ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana, ji
pêşkêşiya şewitandinê ya her timî
û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên
wê yî rijandinê cihêtir in.
26 Û di roja pêncemîn de, neh
ganêr û du beran û yek salî çar-
deh berxikên nêr ên bêqisûr
27 û li gor hejmarên wan, li gor
ûsilê bona ganêran, bona be-
ranan û bona berxikan pêşkêşiya
nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
28 û wekî pêşkêşiya sûcê be, hûn
ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana, ji
pêşkêşiya şewitandinê ya her timî
û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên
wê yî rijandinê cihêtir in.
29 Û di roja şeşemîn de, heyşt
ganêr û du beran û yek salî çar-
deh berxikên nêr ên bêqisûr
30 û li gor hejmarên wan, li gor
ûsilê bona ganêran, bona be-
ranan û bona berxikan pêşkêşiya
nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
31 û wekî pêşkêşiya sûcê be, hûn
ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana, ji
pêşkêşiya şewitandinê ya her timî
û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên
wê yî rijandinê cihêtir in.
32 Û di roja heftemîn de, heft
ganêr û du beran û yek salî çar-
deh berxikên nêr ên bêqisûr
33 û li gor hejmarên wan, li gor
ûsilê bona ganêran, bona be-
ranan û bona berxikan pêşkêşiya
nan û pêşkêşiyên wanî rijandinê
34 û wekî pêşkêşiya sûcê be, hûn
ê nêriyekî pêşkêş bikin; vana, ji
pêşkêşiya şewitandinê ya hertimî
û pêşkêşiya wê yî nan û pêşkêşiyên
wê yî rijandinê cihêtir in.
35 Û di roja heyştemîn de, dê bona
we civîna pîroz bibe; hûn ê qet tu
karê giran nekin; 36 lê belê wekî
pêşkêşiya şewitandinê, pêşkêşiya
ku bi agir ve tête çêkirin û ji XU-
DAN re bêhnxweşî be, ganêrek û
beranek û yek salî heft berxikên
nêr ên bêqisûr 37 û li gor hejmarên
wan, li gor ûsilê bona ganêran,
bona beranan û bona berxikan
pêşkêşiya nan û pêşkêşiyên wanî
rijandinê 38 û wekî pêşkêşiya
sûcê be, hûn ê nêriyekî pêşkêş
bikin; vana, ji pêşkêşiya şewitan-
dinê ya her timî û pêşkêşiya wê yî
nan û pêşkêşiyên wê yî rijandinê
cihêtir in.
39 Xeynî qewlên we û pêşkêşiyên
we yî ji dil nan û pêşkêşiyên we
yî şewitandinê û pêşkêşiyên we yî
nan û pêşkêşiyên we yî rijandinê û
pêşkêşiyên we yî xweşiyê bin, hûn
ê di cejnên xwe de vana pêşkêşî

XUDAN bikin. 40 Û li gor her tiştên ku XUDAN wan ji Mûsa re emir kirine, Mûsa ji lawên Îsraêl re got.

*Qaîdeyên di derbarê Qewlan de*

5.Mûs 23,21-23; Wai 5,3-6

30 Û Mûsa bi serokên ezbetên Îsraêlê re axifî û got: Tiştê ku XUDAN emir kiriye ev e. 2 Ger zilamek qewlê ji XUDAN re bike, an jî bona ku nefsa xwe bi bendikekê girê bide sondê bixwe; dê gotina xwe xera neke; divê li gor her tiştên ku ji devê wî ve derdikeve bike. 3 Û pîrekek di ciwaniya xwe de, di dema hîn li mala bavê xwe de, ji XUDAN re qewl bike û xwe bi bendikekê ve girê bide 4 û dema bavê wê qewla wê û bendika ku nefsa xwe pê girê dayiye bibihîze û ger bavê wê li dijî wê bêdeng bimîne, wê gavê dê hemû qewlên wê bisekinin û her bendikên ku nefsa xwe pê girê dayiye, dê bisekinin. 5 Lê belê ger bavê wê, di roja ku bihîstiye de, bibe manihê wê, dê qet tu yek ji qewlên wê û ji bendikên wê yên pê nefsa xwe girê dayiye nesekinin û dê XUDAN lê biborîne, ji ber ku bavê wê bûye manihê wê.

6 Û ger dema hîn li ser qewlên xwe an jî gotina bêraman ya lêvên xwe be û bizewice[1] û 7 mêrê wê bibihîze û ger di roja ku bihîstiye de li dijî wê bêdeng bimîne, wê gavê dê hemû qewlên wê bisekinin û her bendikên ku nefsa xwe pê girê dayiye, dê bisekinin. 8 Lê belê ger mêrê wê, di roja ku bihîstiye de, bibe manihê wê, wê gavê dê qewla ku li ser xwe û gotina xwe ya bê raman, ya ku nefsa xwe pê girêdayiye betal bike û dê XUDAN lê biborîne.

9 Lê belê qewla pîreka bî an jî hatiye berdan, her tiştên ku canê xwe pê girêdayiye dê li ser wê bisekinin. 10 Û ger li mala mêrê xwe qewl kiribe, an jî bi sond xwarinê nefsa xwe bi bendikê girê dabe 11 û mêrê wê bihîstibe û bêdeng mayî be, wê gavê dê hemû qewlên wê bisekinin û her bendikên ku nefsa xwe pê girê dayiye, dê bisekinin. 12 Lê belê ger mêrê wê, di roja ku bihîstiye de, hemûyan betal kiribe, wê gavê dê di derheqê qewlên wê de, an jî di derheqê bendika ku pê nefsa xwe girêdayiye de, her tiştên ku ji lêvên wê derketine dê nesekine; mêrê wê, wan betal kiriye û dê XUDAN li pîrekê biborîne.

13 Mêrê wê dikare heçî qewlên bona nizm kirina nefsê hatiye kirin û sonda girêdayînê tesdîq bike û mêrê wê dikare wê betal bike. 14 Lê belê mêrê wê her ku roj derbas bibe li dijî wê bêdeng bimîne, wê gavê hemû qewlên

[1] An jî: Bice mêr.

wê, an jî hemû bendikên ku li ser
wê ne tesdîq dike; wan tesdîq kiri-
ye, ji ber ku di roja ku wan bihîs-
tiye de, li dijî wê bêdeng mayiye.
15 Lê belê ger paşî ku wan bihîs-
tibe bitûmî betal bike, wê gavê dê
gunehê pîrekê li xwe bar bike. 16
Di derheqê mêr û jin de, di civa-
niya xwe de, dema hîn ku li mala
bavê xwe be, di derheqê qîz û bav
de, zagonên ku XUDAN ji Mûsa
re emir kirine ev in.

*Ji Midyaniyan tol tête sitendin*
4.Mûs 25,16-18

31 Û XUDAN bi Mûsa
re axifî û got: 2 Ji
Midyaniyan tola lawên Îsraêl
hilde; paşî wê tuyê beşdarî
netewa xwe bibe. 3 Û Mûsa bi
netewê re axifî û got: Bona ku ji
Midyaniyan tola XUDAN hildin
herin Midyanê, ji cengê re di nav
xwe de zilaman bi çek bikin.
4 Bona hemû ezbetên Îsraêlê, hûn
ê ji her ezbetê hezar kesî ji cengê
re bişînin. 5 Û ji hezarên Îsraêlê,
wekî ku ji her ezbetê hezar kes
be, bona cengê donzdeh hezar
kes peyayên bi çek hate dayîn.
6 Û Mûsa ji her ezbetê hezar
peyayî ji cengê re, wan û
Pînehasê lawê kahîn Eleazar,
taximên cîhê pîroz û wekî
boriyên deng bilind di destên
wan de be wan şand cengê.
7 Û mîna ku XUDAN emir dabû
Mûsa, li dijî Midyanê cengê kirin
û her zilamî kuştin. 8 Û ji wan,
di nav yên ku hatibûn kuştin de
qiralên Midyanê, Evî û Rekem
û Tsûr û Hûr û Reba, pênc
qiralê Midyanê kuştin; Balamê
lawê Beor jî bi şûr ve kuştin.
9 Û lawên Îsraêl pîrekên Midyanê
û zarokên wan hêsîr kirin û hemû
heywanên wan û hemû keriyên
wan û hemû malên wan talan
kirin. 10 Û hemû bajarên ku
tê de rûdiniştin û hemû zomên
wan bi agir ve şewitandin. 11 Û
dixwaze bila mirov be, an jî bila
heywan be, hemûya xenîmetê
û hemû malên talanê rahiştin.
12 Û hêsîrên xwe û malê talanê
û xenîmetê, ji Mûsa û kahîn
Eleazar û ji civaka lawên Îsraêl
re anîn artêşgeha ku li zozanên
Moabê ya li hemberî Erîhayê û li
cem Urdunê ye.
13 Û Mûsa û kahîn Eleazar û hemû
begên civakê, bona ku pêşwaziyê
ji wan re bikin, derketin derveyî
artêşgehê. 14 Û Mûsa li dijî
serbaz, serdar û sitvanên artêşa ji
xizmeta cengê ve tên hêrs bû. 15
Û Mûsa ji wan re got: Ma qey we
hemû pîrekan sax hiştin? 16 A vay,
vana bûn sedem ku lawên Îsraêl di
mesela Peor de bi şîreta Balam li
dijî XUDAN êrîş kir û bi vî awayî di
nav civaka XUDAN de weba çêbû.
17 Û niha her mêrê di nav zarokan
de ye, bukujin û her pîreka ku bi

zilam re raketiye û bi vî awayî bi
zilam dizane bukujin. 18 Û hemû
keçikên ciwan ku bi zilam re
raneketine û bi vî awayî bi zilam
nizanin, bona xwe sax bihêlin.
19 Û hûn, heft roj li derveyî
artêşgehê bimînin[1], hûn û hêsîrên
xwe, her kesê ku can kuştiye û her
kesê ku destê xwe li yê ku hatiye
kuştin xistiye, di roja sêwem û di
roja heftemîn de xwe paqij bikin.
20 Û her kincî û hemû pertalên[2]
çerm û her tiştên ku bi rîsê bizinan
ve hatine çêkirin û hemû pertalên
darîn paqij bikin.
21 Û kahîn Eleazar ji zilamên
cengê yên ku çûne şer re got: Za-
gona ku XUDAN emir li Mûsa
kiriye ev e; 22 lê hûn ê zêr û zîv û
tûnc û hesin û qela û gule, 23 her
tiştên ku diyaxî agir dibin ji agir
ve derbas bikin û dê paqij bibe;
lê belê dê bi ava paqijiyê ve bête
paqij kirin û hûn ê her tiştên ku
diyaxî agir nabin, ji avê ve der-
bas bikin. 24 Û di roja heftemîn
de hûn ê kincê xwe bişon û hûn ê
paqij bibin û paşî wê hûn ê bike-
vin artêşgehê.

*Parkirina malê talankirinê*

25 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 26 Tu û kahîn Eleazar û
serokên malên bapîrên civakê,
dixwaze bila zilam be, an jî hey-
wan be, giştikên malê talanê ya ku
hatiye stendin rahêlin 27 û malên
talanê di nav şervanên cengê yên
ku derketine cengê û hemûya ci-
vakê de nêvî bi nêvî par bike.
28 Û tuyê ji leşkerên ku derketine
cengê, dixwaze bila ji zilam be, an
ji dewar be, ji keran be, an ji keri-
yan be, wekî ji pênc sedî canek be,
bona XUDAN bacê bistîne; 29 ji
nêviyê ku ketiye aliyê wan bistînin
û wekî pêşkêşiya XUDAN ya raki-
rinê ye, tuyê wan bide kahîn Elea-
zar. 30 Û ji nêviyê ku ketiye para
lawên Îsraêl ve, dixwaze bila ji zi-
lam be, an ji dewar be, an ji keran
be, an ji keriyan be, ji hemû hey-
wanan, ji her pênciyî yeka ku hati-
ye kişandin bigire û sedî canek be,
bona bacê bistîne û tuyê wan bide
Lêwiyiyên ku notirvaniya şunwara
XUDAN digirin. 31 Û Mûsa û
kahîn Eleazar, mîna ku XUDAN
emir daye Mûsa kirin.
32 Û xenîmeta ji ber malên leşkerên
ku çûne cengê talan kirine maye,
şeş sed û heftê û pênc hezar mîh
33 û heftê û du hezar dewar 34 û
şêst û yek hezar ker 35 û ji pîrekên
ku bi mêr ve raneketine û bi vî
awayî bi mêr nizanin, hemû can
sîh û du hezar bûn. 36 Û nêviyê
para yên ku derketine cengê, bi
hejmarî, sê sed û sîh û heft hezar
û pênc sed mîh bûn 37 û ji mîhan

*1* An jî: Qonaxê deynin. *2* Alavên.

baca XUDAN şeş sed û heftê
û pênc bû. 38 Û dewar sîh û şeş
hezar bûn; ji wan baca XUDAN
heftê û dudo bû. 39 Û ker sîh he-
zar û pênc sed bûn; ji wan baca
XUDAN şêst û yek bû. 40 Û mi-
rov şanzdeh hezar bû; ji wan baca
XUDAN sîh û du can bû. 41 Û
Mûsa baca ku pêşkêşiya rakirina
ya XUDAN e, mîna ku XUDAN
emir daye Mûsa, dan kahîn Elea-
zar.
42 Û ji nêviyê lawên Îsraêl, ya ku
Mûsa ji zilamên ku çûne cengê
par kiriye 43 û nêviyê civakê, sê
sed û sîh û heft hezar û pênc sed
mîh 44 û sîh û şeş hezar dewar
45 û sîh hezar û pênc sed ker
46 û şanzdeh hezar can mirov bûn.
47 Ji nêviyê ku lawên Îsraêlê ye,
dixwaze bila ji mirov be, an jî ji
heywanan be, her yekê ku ji pêncî
ve hatiye kişandin, mîna ku XU-
DAN emir daye Mûsa, Mûsa wan
rahişt û da Lêwiyiyên ku notirva-
niya şunwara XUDAN dikin.
48 Serdar û sitvanên ku serbazên
hezarên artêşê ne, nêzîkî Mûsa bûn
49 û ji Mûsa re gotin: Em qûlên te,
me giştikên zilamên cengê yên ku
di destê me de ne rahiştin û ji me
qet tu zilamek jî ne kêm e. 50 Û
her yek, her çi dîtibin, bona ku ji
bo canê me ji XUDAN re kefaretê
bike, wekî ku pêşkêşiya XUDAN
be, pertalên zêr, xelikên lingan û
bazinan, gustîlkan, guharan û ger-
deniyan anîn. 51 Û Mûsa û kahîn
Eleazar, ji wan zêr û hemû pertalên
ku hatine çinîn ji wan stendin.
52 Û giştikên zêrê ku serdar û sit-
van ji XUDAN re wekî pêşkêşiya
rakirinê be, pêşkêş kirine, şanzdeh
hezar û heft sed û pêncî şekel bûn.
53 Zilamên ku derketibûn cengê,
her yek bona xwe talan rahiştibûn.
54 Û Mûsa û kahîn Eleazar ji ser-
dar û sitvanan zêrê rahiştin û li ber
XUDAN, wê bona lawên Îsraêl
wekî bîranîn be, anîn Çadira Ci-
vandinê.

*Eşîrên ku li Rojhilata Çemê Şerîayê bicîh bûne*

Yêşû 1,12-18; 22,1-34

32 Û heywanên lawên Rûben
û lawên Gad zehf zêde bûn
û warê Yazerê û warê Gîleadê
dîtin û a vay, ew cîh, cîhê hey-
wanan bû 2 û lawên Gad û lawên
Rûben hatin û bi Mûsa re û kahîn
Eleazar re û bi begên civakê re
axifîn û gotin: 3 Atarot û Dîbon û
Yazer û Nîmra û Heşbon û Eleale
û Sebam û Nebo û Beon, 4 ev
warê ku XUDAN li ber çavê civa-
ka Îsraêlê lê xistiye, cîhê heywana
ye û heywanên qûlên te hene. 5 Û
gotin: Ger me di çavên te de qen-
cî[1] dîtibin, bila ev welat bi milkî ji
qûlên te re bête dayîn; me ji Ur-
dunê ve derbas nekin!

---

[1] Lutif, saye, bexş an jî: Dirûd.

6 Û Mûsa ji lawên Gad û lawên Rûben re got: Dê birayên we biçin cengê û qey hûn ê li vir rûnin? 7 Û ma çima hûn dilê lawên Îsraêl ji derbasbûyîna welatê ku XUDAN daye wan, dizivirînin? 8 Dema ji Kadeş-Barneayê bavên we bona dîtina welat şandim, wan jî wusa kirin. 9 Û hilkişiyan heta newala Eşkolê û welat dîtin û bona nekevin welatê ku XUDAN dayiye wan, dilên lawên Îsraêl zivirandin. 10 Û wê rojê hêrsa XUDAN sor bû û sond da û got: 11 Zilamên ku ji Misirê derketine, yên bîst salî û jê berjortir in, dê tu carî welatê ku ji Birahîm, Îshaq û Aqûp re sond dayîme[1], nebînin! Ji ber ku bi tûmî li pêy min nehatin; 12 lê Kalebê lawê Yefûnneyê Kennizî û Yêşûyê lawê Nûn dê bibînin; ji ber ku ew bitûmî li pêy XUDAN hatin. 13 Û hêrsa XUDAN li dijî Îsraêlê sor bû û heta tûmiya ew nifşeya ku di çavê XUDAN de xerabiyê kirine qediyan, çel sal wan di çolê de gerand. 14 Û a vay, bona hêrsa XUDAN ya sor, ya li dijî Îsraêlê ye hîn jî zêde bikin, hûn nîjada zilamên bisûc, lê dêvila bavê xwe hûn rabûn. 15 Ji ber ku ger hûn ji pêy wî vegerin, dê dîsa wan li çolê bihêlin û hûn ê hemûya vê netewê tune bikin.

16 Û hatin cem wî û gotin: Li vir bona keriyên me hewşên mîhan û bona zarokên me em ê bajaran çêbikin; 17 lê belê heta ku lawên Îsraêl bînin cîhên wan, em ê bi çekdarî li çûyîna pêşiya wan de amade bibin û ji ber gelê welat, dê zarokên me li bajarên bi sûr de rûnin. 18 Lawên Îsraêl, heta ku her yek mêrasa xwe rahêle em ê venegerin malên xwe. 19 Ji ber ku li aliyê dinî Urdunê û jê wêdetir em ê tevî wan mêrasê negirin; ji ber ku mêrasa me, li vî aliyê Urdunê, berbi rojhilatê ve ket.

20 Û Mûsa ji wan re got: Ger hûn vêya bikin, hûn ê li ber XUDAN, bona ku herin cengê çekan rahêlin 21 û heta ku neyarên wî ji ber wî biqewirînin 22 û heta ku li ber XUDAN welat di bin daraziyê de bête girtin, ji we her zilamê bi çek li ber XUDAN ji Urdunê ve derbas bibe, hûn ê paşî wê vegerin û hûn ê li dijî XUDAN û li dijî Îsraêlê bêsûc bibin û dê li ber XUDAN ev welat bi milkî bibe ya we. 23 Lê belê ger hûn wusa nekin, a vay, hûn ê li dijî XUDAN sûcê bikin û bawer bikin ku, dê sûcê we, we bibîne. 24 Bona zarokên xwe ji xwe re bajaran û bona mîhên xwe ji xwe re hewşan çêbikin û tiştê ku ji devê we derketiye, bikin. 25 Û lawên Gad û lawên Rûben bi Mûsa re axifîn û gotin: Dê qûlên te, mîna ku efendiyê min emir dayiye bikin. 26 Zarokên me, pîrekên me, keriyên me û hemû heywanên me dê li vir, li

1 An jî: Wad kirime.

bajarên Gîleadê bimînin; 27 lê belê
qûlên te, her zilamê ku bona cengê
bi çek in, mîna ku efendiyê min
gotiye dê bona şer ji ber XUDAN
derbas bibin.
28 Û Mûsa di derheqê wan de
emir da kahîn Eleazar û Yêşûyê
lawê Nûn û serokên malên
bapîrên lawên Îsraêl. 29 Û Mûsa
ji wan re got: Ger lawên Gad û
lawên Rûben, her zilamê bona
cengê bi çek, ji ber XUDAN bi
we re ji Urdunê ve derbas bibin
û li ber we, ger welat di bin dara-
ziyê de bête girtin; wê gavê hûn ê
welatê Gîleadê wekî milk be bi-
din wan; 30 lê belê ger bi çek tevî
we derbas nebin, wê gavê dê li
welatê Kenanê di nav we de milk
bigirin. 31 Û lawên Gad û lawên
Rûben bersivê dan û gotin: Mîna
ku XUDAN ji qûlên te re gotine,
em ê bikin. 32 Em ê bi çek, li ber
XUDAN derbasî welatê Kenanê
bibin û bila milkê mêrasa me li
wêdeya Urdunê bimîne.
33 Û Mûsa, welatê Sîhonê qiralê
Amoriyan û welatê Ogê qiralê
Başanê, welêt li gor dora wê, ba-
jarên welatê li dorê ye da wan;
da lawên Gad û lawên Rûben û
nîv ezbeta Manaşşeyê lawê Ûsiv.
34 Û lawên Gad bajarên bi sûr,
Dîbonê û Atarotê û Aroerê 35 û
Atrot-Şofanê û Yazerê û Yogbe-
hayê 36 û Beyt-Nîmrayê û Beyt-
Haranê û hewşên mîhan ava ki-
rin. 37 Û lawên Rûben Heşbonê
û Elealeyê û Kîryataîmê 38 û
Neboyê û Baal-Meonê, wekî na-
vên wan hatibe guhertin û Sîb-
mayê ava kirin û navên wekî din
dan bajarên ku ava kirine. 39 Û
lawên Makîrê lawê Manaşşe çûn
Gîleadê û wê stendin û Amo-
riyên ku li wir in, qewirandin.
40 Û Mûsa Gîleadê da Makîrê
lawê Manaşşe; ew jî li wir rûnişt.
41 Û Yaîrê lawê Manaşşe çû û
gundên wan girtin û navê Havvot-
Yaîr li wan kirin. 42 Û Nobah çû
û Kenatê û gundên wê girtin û bi
navê xwe jê re got Nobah.

*Rêvîtiya ji Misirê ber ve Moabê*

33 Koçên lawên Îsraêl ên ku
bi destê Mûsa û Harûn, li
gor artêşên xwe ji welatê Misirê
ve derketine ev in. 2 Û Mûsa bi
emrê XUDAN, derketina wan li
gor koçên wan nivîsand û li gor
derketina wan koçên wan ev in.
3 Û di meha yekemîn de, di roja
panzdehan ya meha yekemîn de
ji Ramsesê derketin; roja paşî Fi-
sihê li ber çavên hemû Misiriyan
bi destê bilind ve derketin 4 û Mi-
sirî hemûyên pêşîbûyiyên ku XU-
DAN di nav wan de lêxistibûn,
binax dikirin; XUDAN ji îlahên
wan re jî daraziyan çêkir.
5 Û lawên Îsraêl ji Ramsesê koç
kirin û li Sûkkotê kon danîn. 6 Û
ji Sûkkotê koç kirin û li Etama ku

li qeraxa çolê ye kon danîn. 7 Û
ji Etamê koç kirin û zîvirîn Pî-
Hahîrota li hemberî Baal-Tsefonê
ye û li ber Mîgdolê kon danîn.
8 Û ji ber Pî-Hahîrotê koç kirin û
ji nav behrê derbasî çolê bûn û di
çola Etamê de rêya sê rojî çûn û li
Marayê kon danîn. 9 Û ji Marayê
koç kirin û hatin Elîmê û li Elîmê
donzdeh çavkaniyên avê û heftê
darên xurmê hebûn û li wir konê
danîn. 10 Û ji Elîmê koç kirin û li
cem Behra Gewez ve konê danîn.
11 Û ji Behra Gewez ve koç ki-
rin û li çola Sînayê konê danîn.
12 Û ji çola Sînayê koç kirin û
li Dofkayê konê danîn. 13 Û ji
Dofkayê koç kirin û li Alûşê konê
danîn. 14 Û ji Alûşê koç kirin û li
Refîdîmê konê danîn; li wir bona
netewê ava vexwarinê tunebû.
15 Û ji Refîdîmê koç kirin û li
çola Sînayê konê danîn. 16 Û ji
çola Sînayê koç kirin û li Kîbrot-
Hattaavayê ve konê danîn. 17 Û ji
Kîbrot-Hattaavayê koç kirin û li
Hatserotê konê danîn. 18 Û ji Hat-
serotê koç kirin û li Rîtmayê konê
danîn. 19 Û ji Rîtmayê koç kirin
û li Rîmmon-Peretsê konê danîn.
20 Û ji Rîmmon-Peretsê koç ki-
rin û li Lîbnayê konê danîn. 21 Û
ji Lîbnayê koç kirin û li Rîssayê
konê danîn. 22 Û ji Rîssayê koç
kirin û li Kehelatayê ve konê
danîn. 23 Û ji Kehelatayê koç ki-
rin û li çiyayê Şeferê konê danîn.
24 Û ji çiyayê Şeferê koç kirin û li
Haradayê ve konê danîn. 25 Û ji
Haradayê koç kirin û li Makhelotê
ve konê danîn. 26 Û ji Makhelotê
koç kirin û li Tahatê konê danîn.
27 Û ji Tahatê koç kirin û li Terahê
konê danîn. 28 Û ji Terahê koç ki-
rin û li Mîtkayê konê danîn. 29 Û ji
Mîtkayê koç kirin û li Haşmonayê
konê danîn. 30 Û ji Haşmonayê
koç kirin û li Moserotê konê
danîn. 31 Û ji Moserotê koç kirin
û li Bene-Yaakanê konê danîn.
32 Û ji Bene-Yaakanê koç kirin û
li Hor-Haggîdgadê konê danîn. 33
Û ji Hor-Haggîdgadê koç kirin û
li Yotbatayê konê danîn. 34 Û ji
Yotbatayê koç kirin û li Abronayê
konê danîn. 35 Û ji Abronayê koç
kirin û li Etsyon-Geberê konê
danîn. 36 Û ji Etsyon-Geberê koç
kirin û li çola Tsînê konê danîn[1],
ev Kadeş e. 37 Û ji Kadeşê koç ki-
rin û li çiyayê Horê ya ku li qeraxa
welatê Edomê ye, konê danîn.
38 Û li ser emrê XUDAN, kahîn
Harûn hilkişiya çiyayê Horê û di
çel saliya ku lawên Îsraêl ji Misirê
derketine de, di meha pêncan de,
di yekê mehê de li wir mir. 39 Û
dema Harûn li çiyayê Horê mir,
sed û bîst û sê salî bû.
40 Û qiralê Aradê yê Kenanî ê ku
li welatê Kenanê di başûr de rûdi-
ne, hatina lawên Îsraêl bihîst.

1 Qonax danîn.

41 Û ji çiyayê Horê koç kirin û li
Tsalmonayê konê danîn. 42 Û ji
Tsalmonayê koç kirin û li Pûnonê
konê danîn. 43 Û ji Pûnonê koç ki-
rin û li Obotê konê danîn. 44 Û ji
Obotê koç kirin û li sînora Moabê,
li Iye-Abarîmê konê danîn. 45 Û
ji Iyîmê koç kirin û li Dîbon-Gadê
konê danîn. 46 Û ji Dîbon-Gadê
koç kirin û li Almon-Dîblataîmê
konê danîn. 47 Û ji Almon-Dîb-
lataîmê koç kirin û li çiyayên
Abarîm yên ku hemberî Neboyê
ne konê danîn. 48 Û ji çiyayên
Abarîmê koç kirin û li zozanên
Moabê yên ku li hemberî Erîha û
li kêleka Urdunê ne konê danîn.
49 Û li cem Urdunê ji Beyt-
Yeşîmotê heta Abel-Şittîmê di
zozanên Moabê de konê danîn.
50 Û li zozanên Moabê yên ku li
hemberî Erîha û li kêleka Urdunê
ne XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 51 Bi lawên Îsraêl re biaxi-
fe û ji wan re bibêje: Dema hûn ji
Urdunê derbasî welatê Kenanê bi-
bin, 52 hûn ê hemûyên ku li welêt
rûdinin ji ber xwe biqewirînin û
hemû kevirên wanî bi wêne tune
bikin û hemû pûtên wanî rijandî
tune bikin û hemû cîhên wanî bi-
lind wêran bikin 53 û hûn ê welat
bi milkî bistînin û li wir rûnin,
ji ber ku min wê bona hûn bikin
milk da we. 54 Û hûn ê welat, li
gor eşîrên xwe, bi pişkê ve mêras
bigirin; hûn ê ji yê zêde ye re
mêrasa wî zêde bikin û ji yê ku
hindik e re mêrasa wî kêm bikin;
ji zilamekî re ger pişk bikeve ku
derê, dê ew cîh bibe ya wî; li gor
ezbetên bapîrên we hûn ê mêrasê
bistînin. 55 Lê belê ger hûn yên
ku li welêt rûdinin ji ber xwe ne-
qewirînin, wê gavê yên ku we ji
wan hiştine, dê di çavên we de
bibin mîna kelemê û di koşên we
de bibin mîna misasê û di welatê
ku hûn tê de rûdinin de, dê tenga-
siyê bidin we. 56 Û dê wusa bibe
ku, her çi ka ez ê bi wan ve bikim
fikirîbim, ez ê wê bi we ve bikim.

### *Sînorên Welatê Kenanê*

Hêz 47,13-48,29; Yêşû 15-19

34 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 2 Emir bide lawên
Îsraêl û ji wan re bibêje: Dema
hûn bikevin welatê Kenanê, ev
welatê ku dê bi mêrasî ji we re
bikeve, li gor sînorên xwe welatê
Kenanê, 3 wê gavê dê aliyê we yî
başûrê ji çola Tsînê heta Edomê be
û sînora we yî başûr dê berbi roj-
hilatê ji nîçika Gola Xwê[1] ve be
4 û sînora we dê ji kaşa Akrab-
bîmê berbi başûrê ve bigere û dê
derbasî Tsînê bibe û dê seriyên
wê; li başûrê Kadeş-Barnea bin û
dê hilkişe Hatsar-Addarê û derbasî
Atsmonê bibe 5 û dê sînor ji Ats-
monê heta newala Misirê bigere û

[1] Gola Lût.

dê seriyên wê li cem behrê bin.
6 Û sînorê we yî rojavayê dê
behra mezin û qeraxa wê be; dê
sînorê we yî rojavayê ev be.
7 Û dê sînorê we yî bakur ev be;
ji behra mezin heta çiyayê Horê
hûn ê nîşanê deynin. 8 Û ji çiyayê
Horê heta cîhê ketina Hamatê
hûn ê nîşanê deynin û dê seriyên
sînorê li Tsedadê bin 9 û sînor
derkeve Zîfronê û dê seriyên wê
li Hatsar-Enanê bin; dê sînorê we
yî bakurê ev be.
10 Û sînorê we yî rojhilatê, hûn
ê ji Hatsar-Enanê heta Şefamê
nîşanê deynin 11 û dê sînor ji
Şefamê, li aliyê rojhilata Aiyê
dakeve Rîblayê û dê sînor da-
keve û berbi rojhilatê, dê xwe li
cem Behra Kînneretê bixe 12 û dê
sînor dakeve Urdunê û seriyên wê
dê li cem Behra Xwê be. Welatê
we, li gor dorûbera sînorên xwe
dê vêya be.
13 Û Mûsa emir da lawên Îsraêl
û got: Welatê ku XUDAN emir
daye ku bide neh û nîv ezbetî,
welatê ku hûn ê bi pişkê ve bigi-
rin ev e; 14 ji ber ku ezbeta lawên
Rûben li gor mala bapîrên xwe
û ezbeta lawên Gad li gor mala
bapîrên xwe mêrasên xwe stendin
û nêviyê ezbeta Manaşşe mêrasa
xwe stendin 15 û ev du ezbet û nîv
ezbetê, li Erîhayê ji Urdunê wêde-
tir berbi rojhilatê, berbi rojhilata
başûr mêrasên xwe stendin.
16 Û XUDAN bi Mûsa re axi-
fî û got: 17 Navên zilamên ku
dê welêt ji we re par bikin ev in:
Kahîn Eleazar û Yêşûyê lawê
Nûn. 18 Û hûn, bona ku welêt bi
mêrasî par bikin ji her ezbetê be-
gekê bigirin. 19 Û navên van zila-
man ev in: Bona ezbeta Cihûdayê,
Kalebê lawê Yefûnne. 20 Û bona
ezbeta lawên Şîmeûn, Şemûelê
lawê Ammîhûd. 21 Bona ezbeta
Benyamîn, Elîdadê lawê Kîslon.
22 Û bona ezbeta lawên Dan, bi
begî Bûkkiyê lawê Yoglî. 23 Bona
lawên Ûsiv, bona ezbeta lawên
Manaşşe bi begî Hannîelê lawê
Efod. 24 Û bona ezbeta lawên
Efrayîm, bi begî Kemûelê lawê
Şîftan. 25 Û bona ezbeta lawên
Zebûlûn, bi begî Elîtsafanê lawê
Parnak. 26 Û bona ezbeta lawên
Îssakar, bi begî Paltîelê lawê Az-
zan. 27 Û bona ezbeta lawên Aşer,
bi begî Ahîhûdê lawê Şelomî.
28 Û bona ezbeta lawên Naftalî,
bi begî Pedahelê lawê Ammîhûd.
29 Yên ku bona li welatê Kenanê
mêrasê li lawên Îsraêl ve par bikin,
XUDAN emir kirine vana ne.

*Bajarên ku ji Lêwiyiyan re hatine cihêkirin*

Yêşû 21

35 Û li cem Urdunê li hem-
berî Erîhayê, di zozanên
Moabê de XUDAN bi Mûsa re
axifî û got: 2 Emir bide lawên Îs-

raêl, bila ji mêrasa ku milkên wan
e, bona ku di tê de rûnin bajaran
bidin Lêwiyiyan û bona bajaran,
hûn ê li dora wan çêregehan bidin
Lêwiyiyan. 3 Û bona ku di hun-
dirê wan de rûnin, dê bajarên wan
hebin û dê çêregehên wan, dewar
û malên wan û bona hemû hey-
wanên wan bin. 4 Û çêregehên
bajarên ku hûn ê bidin Lêwiyiyan,
divê bi dorûber ji dîwarên bajêr
ve berbi wêdetirê hezar gez bin.
5 Û bajar wekî di navê de be, ji
derveyî bajêr aliyê wê yî rojhilatê
du hezar gez û aliyê wê yî başûr
du hezar gez û aliyê wê yî rojava
du hezar gez û aliyê wê yî bakur
du hezar gez, hûn ê bipîvin. Dê ev
ê bona wan bibe çêregehê bajar.

*Bajarên Sitargehê*

Yêşû 20

6 Bajarên ku hûn ê bidin Lêwiyi-
yan, dê bibin şeş bajarên sitargeh
yên ku kesê zilam bukuje, bireve
wan û xeynî vana hûn ê çel û du
bajarî bidin. 7 Hemû bajarên ku
hûn ê bidin Lêwiyiyan, dê çel û
heyşt bajar bin; hûn ê vana tevî
çêregehên wan bidin. 8 Û ji milkê
lawên Îsraêl bajarên wan, hûn ê
ji yê ku zêde ye zêde bistînin û
ji yê ku hindik e kêm bistînin; dê
her ezbet, li gor mêrasa ku bikeve
para wê, ji bajarên xwe ve bide
Lêwiyiyan.
9 Û XUDAN bi Mûsa re axifî û
got: 10 Bi lawên Îsraêl re biaxife û
ji wan re bibêje: Dema hûn ji Ur-
dunê derbasî welatê Kenanê bibin,
11 ji xwe re wekî bajarên ku hûn
xwe bisitirînin be, hûn ê bona xwe
bajaran tayîn bikin û yê ku bi ne-
zanî li canekî bixe û zilam bukuje,
dê bireve wir. 12 Û dê bona we,
bibin bajarên ji yê ku tolê hiltîne
sitirandinê û yê ku zilam kuştiye
heta bona daraziyê li ber civakê
bisekine dê nemire. 13 Û bajarên
ku hûn ê bidin, dê bona we bibin
şeş bajarên sitargehiyê. 14 Hûn ê
li aliyê dinî Urdunê sê bajarî bidin
û li welatê Kenanê hûn ê sê bajarî
bidin; dê bibin bajarên sitariyê.
15 Bona ku her yê ku bi nezanî li
can xistiye bireve wir, dê ev şeş
bajar ji lawên Îsraêl re û ji xerîbê
ku di nav wan de ye û ji mêvan re
bibin cîhê sitariyê.
16 Lê belê ger bi haletekî hesin lê
xistibe û ew miribe, ew mêrkuj e;
dê mêrkuj muheqeq bête kuştin.
17 Û ger di destê wî de kevirekî
ku zilam pê were kuştin hebe, pê
lêxistibe û ew miribe, ew mêrkuj
e; dê mêrkuj muheqeq bête kuştin.
18 An jî di destê wî de haletekî
darînî ya mirov pê were kuştin
hebe û lê xistibe û ew miribe, ew
mêrkuj e; dê mêrkuj muheqeq
bête kuştin. 19 Yê ku tola xwînê
hilde, ew bi xwe divê mêrkuj bu-
kuje; dema rastî wî bê, dê wî bu-
kuje. 20 Û ger ji ber kîn û mûdê

wî bukute, an jî ketibe kemînê û
tiştekî avêtibe ser wî û ew miri-
be, 21 an jî ji ber neyariyê ger bi
destê xwe lêxistibe û ew miribe;
yê ku lêxistibe, dê muheqeq bête
kuştin; mêrkuj e; yê ku tola xwînê
hilde dema rastî mêrkuj bê, dê wî
bukuje.
22 Lê belê bêyî neyartiyê nişka
ve wî firisandibe, an jî bêyî keti-
na kemînê tiştekî avêtibe ser wî,
23 an jî wî nedîtibe û kevirekî ku
mirov pê were kuştin bi ser wî ve
xistibe û ew miribe û ger nebûbe
neyarê wî û li xesara wî negeriya-
be, 24 wê gavê civak, dê di nav
yê lêxistiye û li yê ku tola xwînê
hilde de li gor van daraziyan huk-
mê deynin 25 û civak, yê ku zilam
kuştiye dê ji destê yê ku tola xwînê
hildide, xelas bike û civak, dê wî
vegerîne bajarê sitariyê ya ku jê
reviyaye û heta mirina kahînê me-
zin yê ku bi rûnê pîroz ve hatiye
mesh kirin, dê li wir rûnê[1]. 26 Û
ger yê ku zilam kuştiye sînorê
bajara sitariyê ya ku reviyaye wir
derbas bike 27 û yê ku tola xwînê
hilde wî li derveyî sînorê bajarê
sitariyê bibîne û yê tola xwînê hil-
de, yê ku zilam kuştiye bukuje, dê
ew xwînî nebe, 28 ji ber ku heta
mirina kahînê mezin divê li bajarê
ku xwe pê sitirandîbû bimaya û
yê ku zilam kuştiye, paşî mirina
kahînê mezin, dê vegere welatê
ku milkê wî ye.
29 Û vana dê di tûmiya nifşeyên
we de di hemû şunwarên we de,
dê bona we bibin zagon û dara-
zî. 30 Ger zilamek li mirov bixe,
dê mêrkuj bi vegotina[2] şahdeyan
bête kuştin; lê belê bona mirina
canekî şahdeyek tenê şahdeyiyê
neke. 31 Hûn ê bona canê mêr-
kujê ku mustehaqî mirinê ye jî
bertîlê nestînin; lê belê dê mu-
heqeq bête kuştin. 32 Û bona yê
ku reviyayî bajarê xwe yî sitiran-
dinê, di dema heta mirina kahîn
de, bona ku li welêt rûne vegere
hûn ê bertîlê nestînin. 33 Bi vî
awayî, hûn ê welatê ku hûn tê de
ne mindar nekin; ji ber ku xwîn
welat mindar dike û ji ber xwîna
ku tê de rijiyaye bona welat ne bi
tiştekî, lê bi xwîna ku wê rijandi-
ye dê kefaret bête kirin. 34 Tuyê
welatê ku hûn di tê de rûdinin û
ez di navenda wê de rûdinim, ge-
marî neke; ji ber ku ez, XUDAN,
di nav lawên Îsraêl de rûdinim.

*Mêrasa qîzên Tselofhad*

4.Mûs 27,1-11; Yêşû 17,3-4

36 Û ji eşîrên lawên Ûsiv,
begên malên bapîrên ku ji
eşîra lawên Gîleadê, lawê Makîrê,
lawê Manaşşe yî nêzîk hatin û li
ber Mûsa û li ber serokên ku se-

1 Dê li wê derê bijî, an jî: Li wir bimîne.

2 Îfade.

rekên malên bapîrên lawên Îsraêl
in, axifîn 2 û gotin: XUDAN,
bona ku welat bi mêrasî, bi pişkê
ve bide lawên Îsraêl emir da efen-
diyê min û ji dayîna mêrasa bi-
rayê me Tselofhad, ji qîzên wî re,
ji XUDAN ve bona efendiyê min
emir hate dayîn. 3 Û ger ji lawên
Îsraêl, bi lawên ezbetekî wekî din
re bizewicin, wê gavê dê mêrasên
wan ji mêrasa bapîrên me ve we-
rin stendin û dê tevî mêrasa ezbe-
ta ku ew beşdarî wê bûne bibin
û dê ji pişka mêrasa me ve bête
stendin. 4 Û dema yûbîla lawên
Îsraêl bibe, dê mêrasa wan, tevî
mêrasa ezbeta ku ew beşdarî wê
bûne bibe û dê mêrasa wan ji
mêrasa ezbeta bapîrên me ve bête
stendin!
5 Û Mûsa li gor gotina XUDAN
emir da lawên Îsraêl û got: Ezbeta
lawên Ûsiv rast dibêjin. 6 Di der-
heqê qîzên Tselofhad de gotina ku
XUDAN emir daye û gotiye ev
e: Bila bi yê ku di çavên wan de
qenc e re bizewicin; lê dê di nav
eşîra ezbeta bavên xwe de biçin
mêr! 7 Û dê mêrasa lawên Îsraêl
ji ezbetê derbasî ezbetê nebe; ji
ber ku lawên Îsraêl, her yek dê
bi mêrasa ezbeta bapîrên xwe ve
girêdayî bimînin. 8 Û ji ezbetên
lawên Îsraêl her qîza ku bibe
xwedî mêras, lawên Îsraêl, bona
ku her yek bibin xwediyê mêrasa
bavên xwe, dê bi yekî ji eşîrên ez-
beta bavê xwe ye re bizewice. 9 Û
dê mêras ji ezbetekê derbasî ez-
betekî din nebe; ji ber ku ezbetên
lawên Îsraêl, dê her yek bi mêrasa
xwe ve girêdayî bin.
10 XUDAN çawa emir dabe
Mûsa, qîzên Tselofhad wusa ki-
rin; 11 ji ber ku qîzên Tselofhad,
Mahla, Tîrtsa û Hogla û Mîlka û
Noa bi lawên birayên bavên xwe
re[1] zewicîn. 12 Û di nav eşîrên
lawên Manaşşeyê lawên Ûsiv de
çûn mêr û mêrasa wan di ezbeta
eşîra bapîrên wan de ma.
13 Zagon û daraziyên ku XU-
DAN li cem Urdunê, li hemberî
Erîhayê, di zozanên Moabê de bi
navdîtiya Mûsa li lawên Îsraêl re
emir dayîne ev in.

---

[1] Bi pismamên xwe re, an jî: Bi lawên apên xwe re.

# 5. MÛSA[1]

*Pêşgotin*

Berî ku Gelê Îsraêlê bikeve erdên Kenanê, li Moabê warê xwe danîn. Ev pirtûk çend carî banga Mûsa ya ji gel re digire naveroka xwe.

Mijarên girîng yên di Pirtûka Ji Nû Ve Lêkirinê de ne, vana ne:

1. Mûsa bûyerên girîng yên çend salî di bîr de tîne. Dixwaze bînin bîra xwe ku, dema li çolê digeriyan Xwedê çawa gelê Îsraêlê hêvişand û bi vî awayî bibin îtaetkar û dilsozê Xwedê.
2. Mûsa Deh Emirî dubare dike. Girîngiya emirê yekem daxuyanî dike. Bona ku xwe tenê û tenê ji Xwedê re qewl bikin, bangî gel dike. Zagon, destûr û qaîdeyên ku dê di axa Kenanê de ya ku hatiye wad kirin rênîşanî û rêberî ji gel re bike, dîsa daxuyanî dike. Ji ber vê yekê, navê: Ji Nû Ve Lêkirina Zagonê dan pirtûkê.
3. Mûsa, girîngiya peymana ku Xwedê bi wan re kiriye di bîr de tîne û dixwaze dilsozê vê peymanê bimînin.
4. Yeşû, paşî Mûsa, bi serokantiya gel ve tête wezîfedar kirin. Paşî ku murxekî (qesîdeyek) dilsoziya Xwedê di bîr de tîne distirê û eşîrên Îsraêlê pîroz dike, Mûsa li Moabê, li rojhilata Çemê Urdunê dimire.

Mijara herî girîng ya vê pirtûkê ev e: Xwedê gelê xwe yî jê hez dike û wê bijartiye xelas kir û pîroz kir. Divê gel vêya ji bîr neke, bona ku bigihêjin bereketên Xwedê, divê ji wî hez bikin û jê re îtaet bikin.

Naveroka vê pirtûkê, di ayetên 6:4-5an de tête kurtayî kirin. Ev ayeta ku Îsa dibêje emirê herî mezin e wusa dibêje:

Guhdarî bike, ya Îsraêl! Xwedayê me XUDAN, XUDANê tekane ye. Hûn ê bi hemû dilên xwe, bi hemû canên xwe, bi hemû hêzên xwe ji Xwedayê xwe XUDAN hez bikin!

---

1 Ji Nû Ve Lêkirina Zagonê, an jî: Lêvergerandina Zagonê, Şerîetê.

*Xetên Bingehîn:*



| | |
|---|---|
| 1:1-4:49 | Banga Mûsa ji gel re |
| 5:1-26:19 | Mûsa zagonan, emiran dubare dike |
| 27:1-28:68 | Bereket û nalet |
| 29:1-30:20 | Peyman ji nû ve tête çêkirin |
| 31:1-33:29 | Gotinên Mûsa yên dawîn |
| 34:1-12 | Mirina Mûsa |



### *Îsraêlî ji Çiyayê Horebê cuda dibin*

4.Mûs 10,11-36; 12,16

1 Li aliyê dinî Urdunê, li çolê, di navbera Paran û Tofel û Laban û Hatserot û Dî-Zahabê de, li hemberî Sûfê, li Arabayê[1], gotinên ku Mûsa ji hemûya Îsraêlê re gotine ev in. 2 Ji Horebê bi rêya çiyayê Seîr, heta Kadeş-Barneayê yanzdeh roj e. 3 Û paşî ku li qiralê Amoriyan Sîhonê ku li Heşbonê rûdine û li qiralê Başanê Ogê ku li Aştarotê li Edreiyê rûdine xistin, 4 wusa bû ku, di sala çelan de, di meha yanzdehan de, di yekê mehê de Mûsa bi lawên Îsraêl re li gor hemû tiştên ku XUDAN bona wan emir daye wî, axifî. 5 Ji Urdunê wêdetir li welatê Moabê, Mûsa dest bi gotina vê zagonê kir û got: 6 Xwedayê me XUDAN li Horebê bi me re axifî û got: Bes e, li vî çiyayî rûniştina we, 7 vegerin û koç bikin û bikevin çiyayiya Amoriyan û li Arabayê nêzîkî wê ye, li çiyayiyê û li Şefalayê[2] û li Başûr[3] û li ber behrê bikevin hemû deran, bikevin heta çemê mezin, çemê Feratê, bikevin welatê Kenaniyan û Lubnanê. 8 A vay, welat danîm ber we; bikevinê û welatê ku XUDAN bona dayîna bapîrên we, ji Birahîm, Îshaq û Aqûp re û li pêy wan ji nîjadên wan re sond dayiye, ji xwe re bikin milk.

### *Mûsa Serokan wezîfedar dike*

9 Û wê gavê bi we re axifîm û gotim: Ez bi tena xwe nikarim barê we hilgirim; 10 Xwedayê we XUDAN we zêde kir û a vay, hûn îroj bi pirrayî, mîna sitêrkên ezmana ne. 11 Xwedayê bapîrên we XUDAN, mîna ku ji we re gotiye, bila we ji hebûna we hezar qatî zêdetir bike û we pîroz bike! 12 Ma ez çawa li ber zehmeta we û barê we û şerê we ve deyax bikim? 13 Ji xwe

---

1 Geliya kûr ya li başûr û bakurê behra Lûtê ye.

2 Cîhê çiyayî yê ku li rojhilata deşta qeraxê (beravê) ye.

3 Bi Îbranîtî Negeb, aliyê başûrê Cihûdayê ye.

re, li gor ezbetên xwe, zilamên bi
hîkmet û bi fêhmkarî û hatine nas
kirin bigirin û ez ê wan bi serokî
deynim ser we. 14 Û we bersivê
dan min û gotin: Kirina tiştê ku tu
dibêje qenc e. 15 Û min serokên
ezbetên we, zilamên bi hîkmet û
hatine nas kirin girtin û wan li ser
we kirim serokan, serdaran û sit-
vanan û serpênciyan û serdehan û
li gor ezbetên we kirim karmend.
16 Û wê gavê emir dam serwerên
we û gotim: Di nav birayên xwe
de dozan guhdarî bikin û di nava
zilamek û birayê wî de û mêvanê
ku li cem wî ye bi dad daraziyê
bikin. 17 Di daraziyê de tu carî gi-
ramiyê ji mirovan re nekin; hûn ê
yê biçûk jî mîna yê mezin guhdarî
bikin; ji ber mirov hûn ê bêzar ne-
bin; ji ber ku darazî ya Xwedê ye û
hûn ê karê ku bona we zor e ji min
re bînin û ez ê wê guhdarî bikim.
18 Û emrê hemû tiştên ku hûn ê
bikin wê çaxê dam we.

*Gel Sîxûran dişîne*

4.Mûs 13-14; Zeb 106,24-26

19 Û me ji Horebê koç kirin û
mîna ku Xwedayê me XUDAN
emir dabû me, ji rêya çiyayiya
Amoriyan, giştika wê çola mezin
û tirsehêz ya ku hûn dibînin, em
meşiyan û em hatin Kadeş-Bar-
neayê. 20 Û ji we re gotim: Hûn
hatin çiyayiya Amoriyan ya ku
Xwedayê me XUDAN daye me.
21 A vay, Xwedayê te XUDAN
welat danî ber te; hilkişe, mîna ku
Xwedayê bapîrên te XUDAN ji
te re gotiye, ji xwe re bike milk;
metirse û bêzar nebe! 22 Û hûn,
giştikên we hatin cem min û we
gotin: Em ji pêşiya xwe ve zila-
man bişînin û bila bona me sî-
xurtiyê li welêt bikin û bila di
derheqê rêya ku em ê derkevinê û
bajarên ku em ê bigihêjin de aga-
hiyê ji me re bînin. 23 Û ev gotin
ji min re qenc hate xuyanî kirin û
wekî bona her ezbetê zilamek be,
ji we donzdeh zilamî girtim 24 û
vegeriyan û hilkişiyan çiyayiyê û
hatin newala Eşkolê û sîxûrtiyê lê
kirin. 25 Û mêwa welat girtin des-
tê xwe û ji me re daxistin û aga-
hiyê ji me re anîn û gotin: Welatê
ku Xwedayê me XUDAN dide
me qenc e.
26 Û we nexwestin ku hilkişinê û li
dijî emrê Xwedayê xwe XUDAN
rabûn 27 û we di çadirên xwe de
gotegotê kirin û gotin: Ji ber ku
XUDAN ji me dikerihe, bona ku
me helaq bike, wekî ku me bide
destên Amoriyan me ji welatê Mi-
sirê ve derxist. 28 Em derdikevin
ku derê? Birayên me, bi gotina:
Netewe ji me mezintir û hîn jî qam
dirêjtir in, bajar mezin in û heta ez-
mên bi dîwar in û him me lawên
Anak jî li wir dîtin! dilên me hul-
andin. 29 Û ji we re gotim: Bêzar
nebin û ji wan metirsin! 30 Li gor

her tiştên XUDAN Xwedayê we
yê ku di pêşiya we de diçe, li Mi-
sirê û li çolê li ber çavên we kirine,
dê ew bona we, bi xwe cengê bike
31 û te dît ku, di hemû vê rêya ku
heta hûn hatine vî cîhê li wê çolê
de ye, Xwedayê te XUDAN, mîna
ku zilamek lawê xwe hilgire û
bikişîne, te kişand. 32 Lê belê di vî
karî de, we bi XUDAN Xwedayê
xwe, bona çadirê xwe lêxin ji we re
li cîh bigere û bona ku rêya hûn ê
bimeşin nîşanî we bide, 33 êvarî di
agir de û rojê di ewrê de ji pêşiya
we di rê de diçe, bawer nekirin.

*Xudan Îsraêlê bi ceza dike*

34 Û XUDAN dengê gotinên we
bihîst hêrs bû û sond da û got:
35 Welatê qenc yê sond dabûm
ku ez ê bidim bapîrên we, dê ji
van zilamên vê nifşeya xerab,
xeynî Kalebê lawê Yefûnne, dê
tu kes nebînin; 36 lê dê ew bibî-
ne û ez ê welatê ku pêl avêtiyê
bidim wî û lawên wî, ji ber ku
bi tûmî li pêy XUDAN meşiya!
37 Ji rûbalê we de XUDAN bi
min re jî hêrs bû û got: Tuyê jî
nekeve wir! 38 Yêşûyê lawê Nûn
yê ku li ber te sekiniye dê bikeve
wê derê; quwetê bide wî; ji ber ku
dê ew ê welat bi mêrasî li Îsraêlê
par bike. 39 Û zarokên we yên
ku we digotin dê bibin xenîmet û
lawên we yên ku îro çê û xerabê
nizanin, dê bikevin wê derê û ez ê
wê bidim wan û dê ew wê ji xwe
re bikin milk! 40 Lê belê hûn ve-
gerin û ji rêya Behra Gewez koçî
çolê bikin!

*Îsraêl li Hormayê mexlûb dibe*

41 Û we bersivê da û ji min re
got: Me li dijî XUDAN sûc kirin;
li gor her tiştên ku Xwedayê me
XUDAN emir dayîne, em ê der-
kevin û cengê bikin. Û her yekê
we çekên xwe yî cengê li xwe girê
da û di hilkişandina çiyê de sivi-
kiyê kir. 42 Û XUDAN ji min re
got: Ji wan re bibêje: Hilnekişin
û cengê nekin; ji ber ku ez ne di
nav we de me, hûn li ber neyarên
xwe ve neyên lêxistin! 43 Û ji we
re gotim, we jî guhdarî nekirin û
li dijî emrê XUDAN derketin û
kanciyê kirin û hilkişiyan çiyayi-
yê. 44 Û Amoriyên ku li çiyayiyê
rûdinin derketin pêşiya we û mîna
ku moz wusa dikin bera we dan û
ji Seîrê heta Hormayê li we xistin.
45 Û hûn vegeriyan û li ber XU-
DAN giriyan û XUDAN dengê
we guhdarî nekir û guh neda we.
46 Û bi rojên ku hûn li Kadeşê
rûniştin, pirr rojan li wir rûniştin.

*Salên ku Îsraêliyan li Çolê derbas kirine*
4.Mûs 20,14-22

2 Û em vegeriyan û mîna ku
XUDAN emir daye min, em
ji rêya Behra Gewez ve koçî çolê
bûn û pirr rojan li dora çiyayiya

Seîrê geriyan. 2 Û XUDAN bi
min re axifî û got: 3 Bes e, hûn
li dora vê çiyayiyê digerin; vege-
rin bakur. 4 Û emir bide netewê
û bibêje: Hûn ê sînorên birayên
we yên li Seîrê rûdinin, yê lawên
Esav derbas bikin û dê ji we bitir-
sin. Lê belê xwe zehf bihêvişînin!
5 Bi wan re keftûleftê nekin; ji
ber ku ez ê ji welatên wan, qasî
navkoyê ling pêlêke jî nedim we;
ji ber ku çiyayiya Seîrê bi milkî
dam Esav. 6 Hûn ê ji wan bi pera
xwarinê bistînin û bixwin û hûn
ê avê jî ji wan bi pere bistînin û
vexwin. 7 Ji ber ku Xwedayê te
XUDAN te di her karê destê te
de pîroz kir; dizanîbû ku tu di vê
çola mezin de dimeşe; çel sal e
Xwedayê te XUDAN bi te re bû;
tu motajî tu tiştekî nebû. 8 Û em
ji rêya Arabayê, ji Elat û Etsyon-
Geberê, ji cem birayên me yî li
Seîrê rûdinin, lawên Esav ve der-
bas bûn.

Û em vegeriyan û ji rêya çola Moa-
bê ve derbas bûn. 9 Û XUDAN ji
min re got: Zorê nede Moabê û bi
wan re nekeve cengê; ji ber ku ez
ê bi milkî, ji welatê wî nedim te;
ji ber ku welatê Arê bi milkî dam
lawên Lût. 10 – Ji berê ve nete-
weyek mîna Eman û Anakan qam
dirêj, mezin û gellekî ajawe, li wir
rûdiniştin; 11 vana jî mîna Anakan
Refayî tên hesibandin; lê belê Moa-
bî ji vana re digotin Emyan. 12 Û ji
berê ve li Seîrê Horiyan rûdiniştin,
lê belê lawên Esav wan qewiran-
din û mîna ku Îsraêlî li welatê ku
XUDAN bi milkî daye wan dikin,
wan li pêşiya xwe helaq kirin û li
cîhê wan rûniştin. – 13 Niha rabin
û ji newala Zeredê ve derbas bibin.
Û ji newala Zeredê ve derbas bûn.
14 Û mîna ku XUDAN sond daye
wan, heta ku hemûyên zilamên
cengê yên wê nifşeyê ji navbera
artêşgehê ve biqedin, di rojên ku
em ji Kadeş-Barneayê heta derbasî
newala Zeredê bin em meşiyane,
sîh û heyşt sal bûn. 15 Û bona ku
wan ji navbera artêşgehê helaq
bike, heta ku ew qediyan destê
XUDAN jî li dijî wan bû.

16 Û wusa bû ku, dema hemûyên
zilamên cengê ji nav neteweyê mi-
riyan û qediyan, 17 XUDAN bi min
re axifî û got: 18 Tuyê îroj derbasî
Ardana ku sînorê Moabê ye, bibe
19 û dema ku nêzîkî hemberî lawên
Ammon bibe, zorê nede Moabê û
bi wan re nekeve keftûleftê; ji ber
ku ez ê bi milkî, ji welatê lawên
Ammon nedim te; ji ber ku bi milkî
wê dam lawên Lût. 20 – Ew jî
welatê Refayan tê hesibandin; berê
li wir Refayan rûdiniştin û Ammo-
niyan ji wan re digotin Zamzûmî;
21 neteweyek mîna Anakan qam
dirêj û di hejmarê de zêde bûn û
li ber wan XUDAN wan helaq
kir û wan qewirand û li cîhê xwe
rûniştin; 22 çawa ku Horiyan li ber

wan helaq kirin, ji lawên Esav yên
ku li Seîrê rûdinin kiribû û vana
wan qewirandin û heta îroj li cîhên
wan rûniştin. 23 Û Kaftoriyên ku ji
Kaftorê derketin, Avên ku heta Ga-
zayê li gundan rûdinin helaq kirin
û li cîhên wan rûniştin. –
24 Rabin, koç bikin û ji newala
Arnonê derbas bibin; binêre, min
Sîhonê qiralê Heşbonê û welatê
wî da destê te; wekî ku tu bi milkî
bistîne dest pê bike û pê re cengê
bike! 25 Ez ê îroj dest pê bikim û
tirs û toqîniya te deynim ser hemû
netewên di bin ezmanan de ne, dê
ew ê agahiya te bibihîzin û ji ber
te bilerizin û bigevizin.

*Xwedê, Sîhonê qiralê Heşbonê*
*dide destê Îsraêl*

4.Mûsa 21,21-32

26 Û ji çola Kedemotê, ji Sîhonê
qiralê Heşbonê re, bi gotinên
xweşiyê şandiyan şandim û gotim:
27 Ez ji welatê te derbas bibim; ez
ê di sûkê de bimeşim û bi rast û
çepê ve çewt nabim! 28 Tuyê bi
pera xwarinê bifroşe min û ez ê
bixwim û tuyê bi pera avê bifroşe
min û ez ê vexwim; 29 mîna
lawên Esav yên li Seîrê rûdinin
û Moabiyên ku li Arê rûdinin di
derheqê min de kirine bike; lê ji
Urdunê heta em derbasî welatê ku
Xwedayê me XUDAN daye me
bibin ez bi meşê derbas bibim!
30 Lê belê Sîhonê qiralê Heşbon
nexwest ku me ji welatê xwe der-
bas bike; ji ber mîna ku îroj wusa
ye, Xwedayê te XUDAN bona ku
wî bide destê te ruhê wî tund kir û
dilê wî hişk kir. 31 Û XUDAN ji
min re got: Lê binêre; dest pêkirim
û Sîhon û welatê wî li ber te didim;
dest pê bike û wê bi milkî bis-
tîne, da ku, tu welatê wî bi mêrasî
bistîne! 32 Û Sîhon, ew bi xwe û
hemû netewa wî li Yahatsê, bona
cengê derketin hemberî me. 33 Û
Xwedayê me XUDAN li ber me
wî da dest û me li wî û lawên wî
û li hemû netewa wî xistin. 34 Wê
gavê me hemû bajarên wî sten-
din û her bajarî bi mêran û jinan
û zarokan re bitûmî tune kirin; ji
tu kesê ku li pêy bimîne nehiştin;
35 me bona xwe tenê heywanan
û malên bajarên ku me stendine
talan kir. 36 Ji Areora ku li qera-
xa newala Arnonê ye û ji bajarê li
newalê ye, heta Gîleadê bajarekî ji
me seretetir tunebû; Xwedayê me
XUDAN li ber me giştikan dan
dest; 37 lê tu nêzîkî welatê lawên
Ammonê û hemûya qeraxa çemê
Yabbokê û bajarên wê yî çiyayiyê
û qet tu derê ku Xwedayê me XU-
DAN qedexe kiriye nebû.

*Xwedê, Ogê qiralê Başanê dide destê*
*Îsraêl*

4.Mûs 21,33-35; Yêşû 12,1-6

3 Û em vegeriyan û ji rêya Başanê
ve hilkişiyan berbi jor û qiralê

Başanê Og, ew û hemû netewa wî li Edreiyê bona cengê derket hemberê me. 2 Û XUDAN ji min re got: Jê metirse! ji ber ku min wî û hemûya netewa wî û welatê wî da destê te û mîna te li Sîhonê qiralê Amoriyan yê ku li Heşbonê rûdine, kiriye, tuyê li wî jî bike. 3 Û Xwedayê me XUDAN qiralê Başanê Og jî, hemûya netewa wî jî da destê me û heta ku tu kesê wî nemîne me lêxistin. 4 Wê gavê me hemû bajarên wî, şêst bajarî, hemûya aliyê Argobê, li Başanê welatê Og stendin; tu bajarê ku me ji wan nestendibe nema. 5 Xeynî gellekî navçeyên bê dîwar, hemû van bajaran, bi dîwarên bilind, bi deriyan û bi çilmêreyan ve senger bûn. 6 Û mîna ku me ji Sîhonê qiralê Heşbonê re kirine, her bajarî bi mêran û jinan û zarokan ve tune kirin û wan bi tûmî xerabe kirin. 7 Lê belê me bona xwe hemû heywanan û malên bajaran talan kirin. 8 Û wê gavê ji destê her du qiralên Amoriyan yên ku li wêdetira Urdunê ne, ji newala Arnonê heta çiyayê Hermonê me welêt stendin. 9 (Saydayî ji Hermonê re dibêjin Sîrîon û Amoriyan jê re dibêjin Senîr.) 10 Me hemû bajarên deştê û hemûya Gîleadê û li Başanê heta Edreî û Salekaya bajarên welatê Ogin, hemûya Başanê jî bi dest ve xistin. 11 (Ji ber, yê ku ji ber Refayiyan mayiye, tenê qiralê Başanê Og bû; a vay, livînê wî, livînê hesin bûn û ma ew ne li bajarê Rabbayê lawên Ammonê ye? Li gor geza mirovan dirêjiya wê neh gez[1] û firehiya wê çar gez bû.)

*Eşîrên ku li Rojhilata Çemê Urdunê ve bicîh bûne*

4.Mûs 32,33-42; Yêşû 13,8-32

12 Û me wê gavê wî welatî bi milkî stendin; ji Aroera li cem newala Arnonê dest pê bike welêt û nêviyê çiyayiya Gîleadê tevî bajarên wê dam Rûbeniyan û Gadiyan 13 û yê ku ji ber Gîlaedê mayiye û hemûya Başana ku welatê Og e, hemû welatê Argobê dam nêviya ezbeta Manaşşe; (jê re welatê Refayiyan tête gotin. 14 Yaîrê lawê Manaşşe, heta sînorên Geşûriyan û Maakatiyan hemûya welatê Argobê stendin û li wan, li Başanê, li gor navê xwe, navê Havvot-Yaîrê danî û heta îroj wusa tête gotin.) 15 Û Gîleadê dam Makîr. 16 Û ji Rûbeniyan re û Gadiyan re navbera newalê wekî ku sînor be, heta newala Arnonê û heta çemê Yabbokê ya ku sînorê lawên Ammon e, ji Gîleadê 17 û wekî ku Urdun sînor be ji Kînneretê heta Behra Arabayê, heta behra Xwê[2], li aliyê rojhilatê heta berwarên Pîsgayê, Arabayê jî dam wan.

1 Li rasteka menan binêrin.

2 Lût.

18 Û di wê wextê de emir dam we
û gotim: Xwedayê we XUDAN
bona ku hûn ji xwe re bikin milk
vî warî da we; hûn hemûyên egîd,
hûn ê tevî çekan ji ber birayên
xwe, lawên Îsraêl ve derbas bibin.
19 Lê mîna ku XUDAN daye we,
aramiyê bide birayên we jî û heta
ku welatê li paş Urdunê, yê ku
Xwedayê we XUDAN daye wan,
ew jî bi milkî bistînin, jinên we û
zarokên we û heywanên we – ez
pê dizanim ku pirr heywanên we
hene –, 20 dê li bajarên ku dame
we bimînin; wê gavê dê her yek ji
we vegerin milkê ku dame we.

*Xudan çûyîna Mûsa ya Welatê Kenanê qedexe dike*

5.Mûs 32,48-52; 34,1-9

21 Wê gavê emir dam Yêşû û go-
tim: Çavên te tiştên ku Xwedayê
we XUDAN bi van her du qiralan
re kiriye dîtin; ji hemû welatên ku
tu di tê de derbas dibe, dê XU-
DAN wusa bike. 22 Hûn ê ji wan
netirsin! ji ber ku Xwedayê we
XUDAN, yê ku bona we cengê
dike ew e.
23 Û wê gavê li ber XUDAN
geriyam û gotim: 24 Ya Xudan,
XUDAN, te dest pê kir mezinti-
ya xwe û destê xwe yî bi qudret
nîşanî qûlê xwe kir; ji ber ku li ez-
manan û li erdê kîjan îlah heye ku
mîna karên te û qudreta te yî herî
mezin bike? 25 Ez hewînê dikim,
ez derbas bibim û welatê qenc ya
li aliyê dinî Urdunê ye û çiyayiya
qenc û Lubnanê bibînim. 26 Lê
belê XUDAN ji ber we ji min re
hatibû xezebê û min guhdarî ne-
kir û XUDAN ji min re got: Bes
e; êdî di derheqê vî tiştî de, carekî
din ji min re nebêje! 27 Hilkişe
girê Pîsgayê û çavên xwe berbi
rojava, bakur, başûr û rojhilatê
rake û bi çavên xwe ve bibîne;
ji ber ku tuyê vê Urdunê derbas
neke. 28 Û emir bide Yêşû, ce-
saretê bide wî û wî xwurt bike; ji
ber, yê ku derbasî pêşiya vê nete-
wê bibe û welatê ku tuyê bibîne bi
mêrasî li wan par bike ew e! 29 Û
em li çemê li hemberî Beyt-Peorê
ye rûniştin.

*Guhdarkirin ji Îsraêliyan tête xwestin*

5.Mûs 6,1-15; Yêşû 23,6-8

4 Û niha, ya Îsraêl, bona tu zagon
û daraziyên ku hînî te dikim
biki, guhdarî bike; da ku, hûn
bijîn, bikevin hundir û welatê ku
dê Xwedayê bapîrên we XUDAN
bide we, ji xwe re bikin milk.
2 Hûn ê tu tiştî tevî gotinên ku
ji we re emir kirime nekin û jê
kêm nekin, da ku, hûn bi emirên
Xwedayê we XUDAN daye we
bigirin. 3 Tiştên ku XUDAN ji ber
Baal-Peorê kiriye, çavên we dîtin;
ji ber ku Xwedayê te XUDAN,
hemû zilamên ku li pêy Baal-Peor
meşiyane, ji nav te helaq kir. 4 Lê

belê hûn, yên ku bûne dilsozê[1]
XUDAN Xwedayê xwe, hûn
gişt îroj zindî ne. 5 Binêrin, mîna
Xwedayê min XUDAN emir
daye min zagon û daraziyan hînî
we kirim, da ku, hûn li welatê ku
bona ji xwe re bikin milk dikevinê
wusa bikin. 6 Û bi wan bigirin û
bikin; ji ber ku di çavên neteweyan
de ew hîkmet û fêhmkariya we
ye; dê ew hemûyên van zagonan
bibihîzin û: Rastî, ev gelê mezin
neteweyek bi hîkmet û fêhmkarî
ne! bibêjin. 7 Ji ber, çawa her ku
em bangî wî bikin Xwedayê me
XUDAN nêzîkî me ye, ka kîjan
gelê mezin ên ku îlahên wan wusa
nêzîkî wan in, hene? 8 Û mîna
hemûya vê zagona ku îroj datînim
ber we, ka kîjan neteweyek mezin
heye ku zagon û daraziyên wê yî
ewqasî dadî heye?
9 Lê bona hemû tiştên ku çavên
te dibînin tu ji bîr neke û di tûmi-
ya rojên temena xwe de ji dilên te
neqetin xwe biparêze û canê xwe
zehf biparêze û wan ji lawên xwe
re û ji lawên lawên xwe re bibêje!
10 Roja ku tu li Horebê li ber
Xwedayê xwe XUDAN sekinî û
dema ku XUDAN ji min re: Ne-
teweyê ji min re bicivîne û ez ê
gotinên xwe bidim bihîstin, da ku,
di tûmiya rojên ku dê li ser rûyê
erdê bimînin de, hînî ji min tirsînê
bibin û hînî lawên xwe bikin got,
11 hûn jî nêzîk hatin û li berwarê
çiyê[2] sekinîn û çiya heta dilê ez-
manan tarîtî, ewr û di nav reşe ta-
riyê de bi agir ve dişewitî. 12 Û
XUDAN ji nav agir ve ji we re
got; we dengê gotinan bihîstin, lê
belê tu sûretî nedîtin; tenê we den-
gekî bihîstin. 13 Û peymana xwe,
ya ku bona hûn çêbikin gîhand
we, deh emiran ji we re gîhandin
û wan li ser du lewheyê kevir nivî-
sandin. 14 Bona li welatê ku ji bo
hûn ji xwe re bikin milk derbasî
wê bibin wan bikin, XUDAN wê
çaxê bona ku ez we hînî zagon û
daraziyan bikim, emir da min.

*Îkaza li dijî Pûtperestan*

15 Canên xwe zehf biparêzin; ji ber
ku li Horebê, ji nav agir ve roja ku
XUDAN ji we re got we sûretekê
nedîtin; 16 da ku, bona hûn çewtî
fesadiyê nebin û bona xwe di sûretê
mêr an jî jin de, 17 di sûretê heywa-
nekî li erdê ye de, di sûretê civîkek
bi bazik ya ku di ezmanan de difire
de, 18 di sûretê tiştekî ku di axê de
dixirxire de, di wêneya masiyê ku
di ava bin erdê de ye de, di şiklê her
yek tiştî de hûn ê pûtê qewartî çêne-
kin 19 û da ku, tu çavên xwe berbi
ezmanan ve raneke û roj û heyv û
sitêrkan, hemû artêşên ezmanan ên
ku Xwedayê te XUDAN hemû ne-

1 Girêdayiyê.

2 Qûntara çiyê.

teweyên ku di bin hemûya ezmanan
de ne kirine pardar, nebîne û berbi
wan ve neyê çewt kirin û ji wan re
xwar nebe û ji wan re qûlitiyê neke.
20 Û mîna ku îroj wusa ye, bona
hûn bibin neteweya ku mêrasa wî
ye, XUDAN we rahişt û we ji ocaxa
hesin hulandinê, ji Misirê derxist.
21 Û ji ber we, XUDAN bi min re
hêrs bû û bona ku ez ji Urdunê der-
bas nebim û ez nekevim ew welatê
qenc, yê ku Xwedayê te XUDAN
bi mêrasî daye te, sondê da. 22 Lê
belê, ez ê li vî warî bimirim, ji Ur-
dunê ve derbas nebim; lê belê hûn
ê derbas bibin û wî welatê qenc bi
milkî bistînin. 23 Xwe biparêzin, da
ku, hûn peymana ku Xwedayê we
XUDAN bi we re kiriye ji bîr ne-
kin û di sûretê tiştekî ku Xwedayê
te XUDAN ji te re qedexe kiriye
de, bona xwe pûtê qewartî çênekin!
24 Ji ber ku Xwedayê te XUDAN,
agirekî ku dixwe û diqedîne yî,
Xwedayekî çavnebar e!
25 Dema lawên te û lawên lawên
te bibin û dema hûn li welêt de-
mek dirêj rûnin û bikevin fesadi-
yê û di sûretê tiştekî de pûtê qe-
wartî çê bikin û bona ku XUDAN
Xwedayê xwe hêrs bikin, dema
hûn tiştê ku di çavê wî de xerab in
bikin; 26 îroj ez li dijî we ezma-
nan û erdê şahde digrim ku, hûn ê
li ser welatê ku ji Urdunê ve bona
ji xwe re bikin milk derbasî wir di-
bin, muheqeq zû tune bibin; hûn ê
demekî dirêj li ser wê nejîn, lê belê
hûn ê bi tûmî helaq bibin. 27 Û dê
XUDAN di nav neteweyan de we
belav bike û hûn ê di nav gelên ku
XUDAN we bibe nav wan de, bi
hejmarî hindik bimînin. 28 Û hûn
ê li wir ji îlahên karê destên miro-
van in, ji kevir û darê ku nabînin û
nabihîzin û naxwin û bêhn nakin
re qûlitiyê bikin. 29 Lê belê hûn
ê ji wir li Xwedayê te XUDAN
bigerin û dema tu bi hemûya dilê
xwe û bi hemûya canê xwe lê-
kolînê bike, tuyê bibîne. 30 Dema
tu di tengasiyê de be û hemûyên
van tiştan were serê te, di rojên
dawîn de tuyê vegere Xwedayê
xwe XUDAN û gotina wî guhdarî
bike; 31 ji ber ku Xwedayê te XU-
DAN, Xwedayekî dilovan e[1]; te
bernade û te helaq nake û peyma-
na ku ji bapîrên te re sond dayiye
ji bîr nake.

*Xwedayê me XUDAN,*
*XUDANê tekane ye*

5.Mûs 6,4-5

32 Ji ber ku niha, ji roja ku Xwedê
li rûyê erdê mirovan afirandiye, di
derheqê rojên ku berî te ne û ji seri-
yekî ezmanan heta seriyê din de bi-
pirse, gelo tiştekî wusa mezin bûye
an jî tiştekî wusa hate bihîstin?
33 Gelo neteweyek dengê Xwe-
dayê ji nav agir ve dibêje mîna te

[1] Zehf li ber dikeve ye, rehmdar, an jî: Bişefqet e.

bihîstiye û sax mayiye? 34 An jî li gor tiştên ku Xwedayê we XUDAN di Misirê de li ber çavên te, bona we çêkirine, Xwedê bi ceribandinan, bi elametan û bi nuwazeyan û bi cengê û bi destê xwurt û bi toqînên mezin, tu carî rabûye û çûye û bona ku ji xwe re ji nav gelekî din gelekî bigire kiriye? 35 XUDAN, ew Xwedê ye, bona tu bizanibe ku xeynî wî nîne, vî tiştî nîşanî te da? 36 Bona hevotina te, ji ezmanan ve dengê xwe ji te re da bihîstin û li ser erdê agirê xwe yî mezin nîşanî te da û te ji nav agir gotinên wî bihîst. 37 Û ji ber ku ji bapîrên te hez dike, paşî wan nîjada te parast û bona ku neteweyên ji te mezintir û xwurttir ji ber te biqewirîne 38 û wekî welatên wan, mîna ku îroj wusa ye bi mêrasî bide te, ji bo te bîne hundir, ji Misirê te bi aramiya xwe, bi qudreta xwe yî mezin derxist. 39 Û îroj bizanibe û bixe dilê xwe ku, li jor li ezmanan û li jêr li erdê XUDAN, ew Xwedê ye; wekî din nîne. 40 Û bona ku ji te re û li pêy te ji zarokên te re bibe qencî û tu bi dirêjî li ser vî erdê ku Xwedayê te XUDAN abadîn daye te bijî, tuyê bi zagon û emirên ku îroj didim te bigire!

*Bajarên penabergeh*

5.Mûs 19,1-10; Yêşû 20

41 Wê gavê Mûsa, li aliyê dinî Urdunê, berbi rojhilata başûr sê bajarî cuda kir; 42 da ku, bila zilamê ji berê ve kerba wî ji cîranê wî tune be û bi nezanî wî bukuje bireve wir; bireve ji van bajaran bajarekî û sax bimîne; 43 bona Rûbeniyan li welatê deştê, Betsera li çolê ye; bona Gadiyan; li Gîleadê Ramotê û bona Manaşşiyan li Başanê Golan. 44 Û zagona ku Mûsa daniye ber lawên Îsraêl ev e 45 û dema ji Misirê derketin şahdeyî û zagon û daraziyên ku Mûsa ji lawên Îsraêl re gotiye ev in; 46 vana ji Urdunê wêdetir, li welatê Sîhonê qiralê Amoriyanê ku li Heşbonê rûdine, yê ku dema ji Misirê derketin, Mûsa û lawên Îsraêl lê xistibûn, li şetê ku li hemberî Beyt-Peorê ye got. 47 Û wekî milk be welatê wî û welatê Ogê qiralê Başanê, welatê du qiralên Amoriyan yên ku li wêdetirê Urdunê berbi rojhilata başûr in, 48 ji Areora li hemberî newala Arnonê ye heta çiyayê Siyonê (ew Hermon e) 49 û ji Urdunê wêdetir berbi rojhilatê heta behra Arabayê hemûya Arabaya ku di bin berwarên Pîsgayê de ne stendin.

*Deh Emir*

2.Mûs 20,1-17

5 Û Mûsa bangî hemûya Îsraêlê kir û ji wan re got: Ya Îsraêl, li zagon û daraziyên ku îroj ez ê ji we re bibêjim guhdarî bikin, da ku, hûn hînî wan bibin û bona kirina wan balkêş bin! 2 Xwedayê me XU-

DAN li Horebê bi me re peymanek
danî. 3 XUDAN vê peymanê ne bi
bapîrên me re, lê belê bi me re kir,
em ku, îroj em gişt li vir li jiyîne
ne. 4 XUDAN li çiyê ji nav agir ve
bi we re rû bi rû axifî; 5 wê gavê
bona ku gotina XUDAN bighînim
we, ez di navbera XUDAN û we de
disekinîm; ji ber ku hûn ji ber agir
ditirsiyan û hilnekişiyan çiyê, got:
6 Xwedayê te XUDAN yê ku te
ji welatê Misirê, ji mala hêsîrtiyê
derxistiye ez im.
7 Dê li hemberê min îlahên te yî
wekî din nebe.
8 Tuyê bona xwe sûretê pûtê qe-
wartî, yê li jor li ezmana ye, an jî
li jêr li erdê ye, an jî di bin erdê de
di avan de ye qet çêneke; 9 tuyê
ji wan re xwar nebe û ji wan re
peristinê neke; ji ber ku ez, Xwe-
dayê te yî XUDAN, ji yên ku ji
min dikerihin, gunehên bavikan li
ser zarokan, li ser nifşeya sêwem
û çaremîn ve digerim. 10 Lê belê
bi hezarên yên ku ji min hez dikin
û bi emirên min ve digirin re xêrê
dikim, Xwedayekî çavnebar im.
11 Tuyê navê Xwedayê xwe XU-
DAN li cîhê vala[1] negire devê
xwe; ji ber ku XUDAN, yê ku
navê wî li cîhê vala digire devê
xwe, dê bêsûc negire.
12 Bona pîroz kirina roja Sebtê,
mîna ku Xwedayê te XUDAN
emir daye te bi wan bigire. 13 Tuyê
şeş rojî bixebite û hemûya karê
xwe bike; 14 lê belê roja heftan ji
Xwedayê te XUDAN re Sebt e; tu
û lawê te û qîza te û dîlê te û cariya
te û gayê te û kerê te û qet tu hey-
wanên te û xerîbê ku di deriyên te
de yî, hûn ê qet tu karî nekin; da
ku, dîlê te û cariya te mîna te ra-
westin. 15 Û tuyê dîlitiya xwe yî
welatê Misirê û ka Xwedayê te
XUDAN çawa bi destê biqudret û
bi destê dirêjbûyî derxistiye di bîra
xwe de bîne; bona wê Xwedayê te
XUDAN girtina roja Sebtê ji te re
emir kir.
16 Mîna ku Xwedayê te XUDAN
emir daye te, ji bavê xwe û dayika
xwe re hurmetê bike; da ku, bila
temena te dirêj bibe û di axa ku dê
Xwedayê te XUDAN bide te de ji
te re qencî bibe!
17 Tuyê nekuje!
18 Û tuyê zinê neke!
19 Û tuyê nedize!
20 Û tuyê li dijî cîranê xwe bi de-
rewîn şahdeyiyê neke!
21 Û tuyê çav bernede jina cîranê
xwe û mala cîranê xwe, zevî û
dîlê wî û cariya wî û ganêrê wî û
kerê wî û tuyê çav bernede tu tiştê
cîranê xwe!
22 XUDAN van gotinan ji hemû
civaka we re, li çiyê ji nav agir,
ewr û reşe tariyê ve, bi dengekî
bilind got û wekî din tiştekî negot.
Û vana li ser du lewheyên kevirî

[1] Bi valahî, bêsedem.

nivîsand û wan da min. 23 Û wusa
bû ku, hîn çiya bi agir ve dişewitî,
dema we ji nav tariyê ve deng
bihîstin hemû serokên ezbetên
we û kalepîrên we nêzîkî min bûn
24 û we gotin: A vay, Xwedayê
me XUDAN mezintî û bilindahiya
xwe nîşanî me da û me ji nav agir
ve dengê wî bihîstin; îroj me dît ku
Xwedê bi mirov re diaxife û mirov
sax dimîne. 25 Û ma niha çima
em bimirin? Ji ber ku dê ev agirê
mezin me bixwe û biqedîne; ger
em carekî din dengê Xwedayê xwe
XUDAN bibihîzin, wê gavê em ê
bimirin! 26 Ji ber ku ma ji hemû
mirovan yê dengê Xwedayê ku ji
nav agir ve diaxife û zindî ye, wekî
me bihîstin bihîstiye û sax maye
kî heye? 27 Tu nêzîk bibe û hemû
tiştên ku Xwedayê me XUDAN
bibêje tu guhdarî bike û hemû
tiştên ku Xwedayê me XUDAN ji
te re bibêje, tu ji me re bibêje û em
ê guhdarî bikin û wan bînin[1] cîh!
28 Û dema we ji min re gotin,
XUDAN gotinên we bihîstin û
XUDAN ji min re got: Tiştên ku
vê neteweya ji te re gotin bihîstim;
her tiştên ku gotin, qenc gotin.
29 Xwezîka bila di wan de dilekî
wusa hebûya, da ku, ji wan re û
abadîn ji lawên wan re bibe qencî
ji min bitirsin û her tim bi giştikên
emirên min bigirin! 30 Here û ji
wan re: Vegerin çadirên xwe! bi-
bêje. 31 Lê belê tu li vir, li cem
min bisekine û hemû emir û zagon
û daraziyên ku tuyê hînî wan bike,
ez ê ji te re bibêjim; da ku, wan
li welatê ku bona ji xwe re bikin
milk, ez didim wan, vana bînin
cîh! 32 Hûn ê bala xwe bidinê ku,
tiştên Xwedayê we XUDAN ji
we re emir kirine bikin; hûn ê bi
rast û çepê ve çewt nebin. 33 Hûn
ê di hemû rêyên ku Xwedayê we
XUDAN ji we re emir kiriye de
bimeşin. Da ku, hûn sax bimînin
û ji we re bibe qencî û li welatê ku
hûn ê bi milkî bistînin di demekî
dirêj de bijîn.

*Emira Herî Mezin*

Marq 12,28-34

6 Û emir, zagon û daraziyê ku
Xwedayê we XUDAN, ji
bo hûn dema derbasî welatê ku
hûn ê ji xwe re bikin milk bibin,
wan bînin cîh vana ne; 2 da ku,
di hemû rojên jiyana xwe de tu
û lawê te û lawê lawê te, bi gir-
tina hemû emir û zagonên ku ji te
re emir kirime, ji Xwedayê xwe
XUDAN ve bitirse ku, temena te
dirêj bibe. 3 Û ya Îsraêl, tuyê guh-
darî bike û bona kirinê bala xwe
bide, da ku, ji te re bibe qencî û
mîna ku Xwedayê bapîrên te XU-
DAN ji te re wad kiriye, li welatê
şîr û hungiv diherikin hûn bi zê-
deyî pirr bibin!

[1] Çêbikin.

4 Guhdarî bike, ya Îsraêl: Xwe-
dayê me XUDAN, XUDANê ku
yek e! 5 Û tuyê Xwedayê xwe
XUDAN bi hemûya dilê xwe û
bi hemûya canê xwe û bi hemûya
hêza xwe hez bike. 6 Û ev gotinên
ku îroj ez ji te re emir didim, dê
di dilê te de bin 7 û tuyê wan baş
bixîne hişê lawên xwe û dema tu
di mala xwe de rûnê û di rê de
bimeşe û rakeve û rabe, di derheqê
vana de biaxife. 8 Û tuyê wan
mîna ku nîşan be, li ser destê xwe
ve girê bide û ew ê di nav çavên te
de bibin bendikên eniyê. 9 Û tuyê
wan li ser sitûnên deriyê xwe û li
ser deriyên xwe binivisîne.

*Îkaza li dijî guhdarnekirinê*

10 Û dê wusa bibe ku, Xwedayê te
XUDAN, bona ku bajarên mezin
û qenc yên te ava nekirine û hemû
xaniyên bi giştikên tiştên qenc ve
tijî, yên ku te wan danegirtine 11 û
sarincên hatine kolandin, yên ku te
wan nekolandine û rez û zeytûnên
ku te neçikandine, bide te, te bîne
welatê ku ji bapîrên te re, ji Bi-
rahîm, Îshaq û Aqûp re soz dayîne û
dema ku tu bixwe û têr bibe, 12 qet
nebe, XUDANê ku te ji welatê Mi-
sirê, ji xaniyê koletiyê derxistiye ji
bîr neke. 13 Tuyê ji Xwedayê xwe
XUDAN ve bitirse û jê re qûlitiyê
bike û tuyê bi navê wî ve sondê bi-
xwe. 14 Hûn ê li pêy îlahên din yên
ku îlahên neteweyên li dora we ne
nemeşin; 15 da ku, hêrsa Xwedayê
te XUDAN li dijî te sor nebe û te ji
rûyê erdê ve helaq neke; ji ber ku
Xwedayê te XUDAN yê ku di nav
te de ye Xwedayekî çavnebar e.
16 Mîna ku we li Massayê ceri-
bandine, divê hûn Xwedayê xwe
XUDAN neceribînin. 17 Hûn ê
bi zexmî bi emir û şahdeyî û za-
gonên ku Xwedayê we XUDAN
ji te re emir dayîye, bigirin. 18 Û
tuyê ya ku di çavê XUDAN de
qenc e û rast e bike, da ku, bila
ji te re bibe qencî 19 û tu bikeve
hundir û mîna ku XUDAN goti-
ye, welatê qenc yê ku ji bo hemû
neyarên te ji ber te biqewirîne ji
bapîrên te re sond dayiye tu ji xwe
re bike milk.
20 Ger di pêşiyê de lawê te ji te
re bi gotina: Zagon û darazî û
şahdeyiyên ku Xwedayê me XU-
DAN ji we re emir dayîne çi ne? bi-
pirse, 21 tuyê ji lawê xwe re bibêje:
Em li Misirê, koleyên Fîrawûn bûn
û XUDAN bi destê bi qudret me ji
Misirê derxist 22 û XUDAN li Mi-
sirê, li ber çavên me, li ser Fîrawûn
û li ser hemûya mala wî, elametên
mezin û dilşewat û nuwazeyan dan
xuya kirin 23 û bona bide me, me
bîne welatê ku soz daye bapîrên me
ku dê bide me, me ji wir derxistin.
24 Em ji Xwedayê xwe XUDAN
bitirsin, bila di hemû rojan de ji me
re bibe qencî û mîna ku îroj bûye
bona ku me sax bihêle, XUDAN

girtina hemû van zagonan ji me re
emir kir. 25 Û ger em li ber Xwe-
dayê xwe XUDAN bala xwe bidin
û mîna ku ji me re emir dayiye bi
hemû van emiran bigirin, dê bona
me başbûn be.

*Gelê Rasteqîn yê Xwedê*

2.Mûs 34,11-17

7 Dema Xwedayê te XUDAN, te
bibe welatê ku tu bona ji xwe
re bike milk diçê û ji ber te gellek
neteweyan, Hîttiyan û Girgaşiyan
û Amoriyan û Kenaniyan û Perîz-
ziyan û Hîviyan û Yebûsiyan, heft
neteweyên ji te mezintir û xwurt-
tir biqewirîne 2 û dema Xwedayê
te XUDAN wan li ber te bide dest
û dema tu li wan bixe, tuyê wan
bi tûmî tune bike; tuyê bi wan re
peymanê daneyne û divê heyfa te
li wan neyê 3 û tuyê merivantiyê
bi wan re neke; tuyê qîza xwe nede
lawê wî û qîza wî ji lawê xwe re
neyne. 4 Ji ber ku dê ew ê lawê te
ji pêy min meşandinê re çewt bike
û dê ji îlahên wekî din re qûlitiyê
bikin û dê hêrsa XUDAN li dijî
we sor bibe û dê zû te tune bike.
5 Lê belê hûn ê bi vî awayî ji wan
re bikin: Hûn ê pêşkêşîgehên wan
xera bikin û kevirên wanî çikandî
perçe perçe bikin û Aşerên wan bi
bivir ve jê bikin û pûtên wanî qe-
wartî di agir de bişewitînin.
6 Ji ber ku tu ji Xwedayê xwe XU-
DAN re neteweyek pîroz e; Xwe-
dayê te XUDAN bona ji hemû ne-
teweyên li rûyê erdê ne, netewek
mexsûsî wî bin te hilbijart. 7 Ji
aliyê XUDAN ve, hezkirina we û
hilbijartina we ne ji ber zêdeyiya
we bûn; ji ber ku hûn ji hemû nete-
weyan kêmtir bûn; 8 lê belê ji ber
ku XUDAN ji we hez dike û di-
xwaze ku bi sonda dayiye bapîrên
we bigire, XUDAN we bi destê bi-
qudret ve derxist û ji mala koletiyê,
ji destê qiralê Misirê Fîrawûn we
xelas kirin. 9 Û bizanibe ku, Xwe-
dayê te XUDAN, yê ku Xwedê ye
ew e, Xwedayê dilsoz bona yên ku
jê hez dikin û bi emirên wî digirin
heta hezar nifşeyan peymanê û
xêrê diparêze 10 û bona yên ku jê
dikerihin tune bike, li ber rûyê wan
dide yî; dê ji dayîna yê ku jê dike-
rihe dereng nemîne, li ber rûyê wî
wê bide. 11 Û tuyê bi emir û zagon
û daraziyên ku bona tu çêbike, îroj
ji te re emir didim bigire!

*Xelata dê ji kesên ku li gor Emiran kirine re bête dayîn*

5.Mûs 28,1-14; 2.Mûs 23,22-33

12 Û dê wusa bibe ku, ji ber we van
daraziyan guhdarî kirin û bi wan
girtin û we wan kirin, dê Xwedayê
te XUDAN peyman û xêra ku ji
bapîrên te re sond dayîbû bona te
biparêze 13 û dê ji te hez bike û
te pîroz bike û te zêde bike û li
welatê bona bide te ji bapîrên te re
sond dayiye, dê berhemê bedena

te û berhema erdê te û genimê te û xemra te yî nû û zeyta te û golikên dewarên te û berxikên keriyên te pîroz bike. 14 Û tuyê ji hemû neteweyan zêdetir pîroz bibe; dixwaze bila mêr be, an jî jin be, di nav we de û di nav heywanên we de stewr nebe. 15 Û dê XUDAN her nexweşiyê ji te rake û qet merezekî erjeng yên Misirê, ji yên ku tu pê dizane daneyne ser te, lê belê dê wan deyne ser hemûyên ku ji te dikerihin. 16 Û tuyê hemû neteweyên ku Xwedayê te XUDAN wan bide destên te biqedîne; dê heyfa te li wan neyê[1] û tuyê ji îlahên wan re qûlitiyê neke; ji ber ku dê ji te re bibe dafik.

17 Û ger tu di dilê xwe de: Ev neteweyan ji min zêdetir in; ma ez ê çawa milkên wan bistînim? bibêje, 18 tuyê ji wan netirse; tiştê ku Xwedayê te XUDAN li Fîrawûn û li hemûya Misirê kiriye; 19 hemû ceribandinên ku çavên te wan dîtine û elamet û nuwazeyan û destê bi qudret û milê ku hatiye dirêj kirin ên ku Xwedayê te XUDAN te bi wan derxistiye baş bîne bîra xwe; dê Xwedayê te XUDAN ji hemû neteweyên ku tu ji wecê wan ditirse re wusa bike. 20 Wekî din Xwedayê te XUDAN, heta ku yên ji ber wan mayîne û xwe veşartine ji ber te tune bibin, dê mozan bişîne nav wan. 21 Tuyê ji wan bêzar nebe; ji ber ku Xwedayê mezin û bi sawêr, Xwedayê te XUDAN, di nav te de ye! 22 Û Xwedayê te XUDAN, dê wan neteweyan hindik û hindik ji ber te biqewirîne; tu nikarî bi zûkayî wan biqedînî, ya na dê heywanê beyarê li ser te zêde bibin. 23 Û Xwedayê te XUDAN, dê wan li ber te bide dest û heta ku wan helaq bike bi şikestandina mezin bişkîne. 24 Û dê qiralên wan bide destê te, tuyê navên wan ji bin ezmanan ve tune bike; heta ku tu wan tune bike, dê tu kes li ber te nesekine. 25 Hûn ê pûtên qewartî yên îlahên wan di agir de bişewitînin; tuyê çav nevêje zêr û zîvên li ser wan in û tuyê bona xwe ranehêle, ya na tuyê bi wan bikeve dafikê; ji ber ku ew ji Xwedayê te XUDAN re mekrûh e. 26 Û bona ku tu mîna wê bi nalet nebe, tuyê tiştê mekrûh neyne mala xwe; tuyê ji wê zehf bikerihe û ji wê erjengî bibe; ji ber ku ew bi nalet e.

*Xudan ji bîr nekin*

5.Mûs 11,1-17

8 Hûn ê îroj bona kirinê bi hemû emirên ku ji te re emir kirime bigirin, da ku, hûn bijîn û zêde bibin û bikevin hundir û welatê ku XUDAN ji bapîrên we re sond

[1] An jî: Dê heyfa çavê te li wan neyê.

dayiye bi milkî bistînin. 2 Û tuyê
rêya çel sal di çolê de meşiyanê,
ya ku Xwedayê te XUDAN, bona
ku te nizm bike û biceribîne û ka
tuyê bi emirên wî bigire an jî ne-
gire, ya ku di dilê te de bizanibe,
hemûya vê rêya di bîra xwe de
bîne. 3 Û te nizm kir û te birçî
hişt û bona bighîne te a vay, mi-
rov tenê bi nan najî, lê belê bi her
gotinê ku ji devê XUDAN ve der-
dikeve mirov dijî, manna ku tu pê
nizane û bapîrên te pê nizane bi
te da xwarin. 4 Di vî çel salî de
kincê ku li ser te ye kevin nebû û
lingê te newerimî. 5 Û tuyê di dilê
xwe de bizanibe ku, Xwedayê te
XUDAN mîna zilamê ku lawê
xwe perwerde dike, te perwerde
dike. 6 Û bona ku di rêyên Xwe-
dayê xwe XUDAN de bimeşe û
ji wî bitirse, tuyê bi emirên wî
bigire! 7 Ji ber ku Xwedayê te
XUDAN, te dibe welatê qenc,
newalên ku diherikin, çavkani-
yên ku di çeman de û di giran
de dizên û welatê çavkaniyan;
8 welatê genim û ceh û mêw û
hêjîr û hinarê, welatê zeytê û hun-
giv; 9 welatek wusa ku, di wê de
tuyê bi xizaniyê nan nexwe, di wê
de tuyê motajî tu tiştî nebe; wela-
tekî wusa ye ku, kevirên wê hesin
in û tuyê ji çiyayên wê sifirê[1] der-
xîne. 10 Û tuyê bixwe û têr bibe û
ji ber welatê qenc ya ku daye te,
tuyê ji Xwedayê xwe XUDAN re
şikiryê bike.
11 Xwe ji bîrkirina Xwedayê xwe
XUDAN û ji negirtina emirên
wî, daraziyên wî û zagonên wî
yên ku îroj ji te re emir dikim bi-
parêze; 12 da ku, dema tu bixwe
û têr bibe û malên qenc ava bike
û tê de rûnê 13 û dema dewar û
keriyên te zêde bibin û dema zîv
û zêrê te zêde bibin û dema her
tiştên te zêde bibin; 14 bila dilê te
bilind nebe û Xwedayê xwe XU-
DAN yê ku te ji welatê Misirê, ji
mala dîlitiyê derxistiye, 15 yê ku
te di çola mezin û tirsehêz ya ku
tê de mar û dûpişkên dişewitînin
û axa bêav û ziwa hene de daye
meşandin û ji zinarê stûr ve bona
te avê derxistiye 16 û bona ku te
nizm bike û ya dawîn qenciyê bi
te re bike ji bo ku te biceribîne,
manna ku bapîrên te pê nizanin di
çolê de bi te ve daye xwarin, ji bîr
neke 17 û da ku, tu di dilê xwe
de: Yê ku bona min vê hebûnê
çêkiriye qudreta min û destê minî
xwurt e! nebêjî. 18 Lê belê bona
peymana ku ji bapîrên te re sond
dayiye, mîna ku îroj wusa ye, dîsa
jî çik bisekinîne, tuyê Xwedayê
xwe XUDAN di bîra xwe de bîne,
ji ber bona qezenc kirina hebûnê
yê qudretê daye te ew e. 19 Û dê
wusa bibe ku; ger tu Xwedayê
xwe XUDAN ji bîr bikî û li pêy

---
1 Paxir.

îlahên neteweyên din bimeşî û ger
tu ji wan re qûlitiyê bikî û ji wan
re secde bikî, îroj ez li hemberî we
şahdeyiyê dikim ku, muheqeq hûn
ê helaq bibin. 20 XUDAN çawa
neteweyan ji ber we tune kiribe,
hûn ê bi vî awayî tune bibin; ji ber
ku we gotinên Xwedayê xwe XU-
DAN guhdarî nekirin.

9 Guhdarî bike, ya Îsraêl! nete-
weyên ku ji te mezintir û bi
qudret, neteweya ku qam dirêj û
mezin, 2 lawên Anak yên ku tu bi
wan dizanî û te di derheqê wan de
bihîstiye ku: Ma kî dikare li dijî
lawên Anak bisekine? hatiye go-
tin, bajarên ku heta ezmanan bi
dîwar, bona ku ji xwe re bike milk
bikeve hundir, tu îroj ji Urdunê
derbas bibe. 3 Û îroj bizanibe, yê
ku ji ber te derbas dibe Xwedayê
te XUDAN e, ew agirê ku dixwe
û diqedîne yî; dê wan helaq bike û
li ber te histuyan li wan xwar bike
û tuyê wan biqewirînî û mîna ku
XUDAN ji te re gotiyê tuyê bi
lezî wan tune bikî.

*Gotin guhdarîkirina Gel*

4 Paşî ku Xwedayê te XUDAN
wan li ber te avêt derve, di dilê xwe
de bi gotina: Ji ber çêbûna min,
bona ez vî welatî bi milkî bistînim
XUDAN min anî hundir nebêje; lê
ji ber xerabiya van neteweyan wan
ji ber te diqewirîne. 5 Bona ku tu
welatê wan bi milkî bistîne ketina
te yî hundir ne ji ber çêbûna te û
ji rastiya dilê te ye; lê ji ber xera-
biya van neteweyan û bona soza
XUDAN ya ji bapîrên te, Birahîm,
Îshaq û Aqûp re sond dayiye çik
deyne, Xwedayê te XUDAN wan
ji ber te diqewirîne.
6 Û tuyê bizanibe ku, bona milk
kirina vî welatî, Xwedayê te XU-
DAN, ji ber çêbûna te wê nade te;
ji ber ku tu neteweyek bi histu stûr
e. 7 Di bîra xwe de bîne ku te Xwe-
dayê xwe XUDAN li çolê hêrs kir,
ji bîr neke! Ji roja ku tu ji welatê
Misirê ve derketiye heta tu hatiye
vê derê, hûn li dijî XUDAN asê
bûn. 8 Û we li Horebê XUDAN
hêrs kirin û XUDAN bona ku we
helaq bike hate xezebê. 9 Dema
ez bona rahiştina lewhayên kevirî,
lewhayên peymana ku XUDAN
bi we re kirine bistînim, derketim
çiyê, çel roj û çel şevî li çiyê mam;
nan nexwarim û avê venexwarim.
10 Û XUDAN, du lewhayên ke-
virîn yên bi tilîka Xwedê ve hatine
nivîsandin da min û li ser wan, li
gor hemû gotinên ku di roja ci-
vandinê de, li çiyê di nav agir de
XUDAN bi we re axifîbû, hatibûn
nivîsandin. 11 Û wusa bû ku, paşî
çel rojî û çel şevî, XUDAN du
lewhayên kevirî, lewhayên pey-
manê dan min. 12 Û XUDAN ji
min re got: Rabe, zû ji vir dake-
ve! ji ber netewa te ya ku te wan

ji Misirê ve derxist, ketin fesadiyê;
ji rêya ku ji wan re emir kirime zû
çewt bûn; ji xwe re pûtekî rijandî
çêkirin. 13 Û XUDAN bi min re
axifî û got: Vê neteweyê dîtim û
a vay, neteweyek bi histu stûr in;
14 min bihêle, ez wan helaq bikim
û ji bin ezmanan ve navên wan
paqij bikim û ez ê te bikim nete-
weyek ji wê xwurttir û ji wê me-
zintir! 15 Û ez vegeriyam û ji çiyê
daketim û çiya bi agir ve dişewitî
û du lewhayên peymanê di her du
destên min de bûn. 16 Û dîtim ku û
a vay, we li dijî Xwedayê xwe XU-
DAN sûcê kiribûn; we ji xwe re
golikekî rijandî çêkiribûn; ji rêya
ku XUDAN ji we re emir kiribû zû
çewt bûbûn. 17 Û bi her du lewha-
yan girtim û wan ji her du destên
xwe avêtim û wan li ber çavên we
perçe kirim. 18 Û bona ku hûn XU-
DAN hêrs bikin, bi kirina ya ku di
çavê wî de xerab e ji hemû sûcê ku
we kirine, mîna ku pêşiyê jî wusa
bûye, çel roj û çel şevî li ber XU-
DAN xwe avêtim erdê û mam; nan
nexwarim û avê venexwarim. 19 Ji
ber ku ez li ber hêrsa XUDAN ya
bona ku we helaq bike, li dijî we ye
û ji ber xezeba wî ya tund tirsiyam.
Lê belê XUDAN vê carê jî min
guhdarî kir. 20 Û XUDAN li dijî
Harûn zehf hêrs bû û dê wî helaq
bikira; wê gavê bona Harûn jî lava
kirim. 21 Û sûcê we, golika ku we
çêkiribû rahiştim û wê di agir de
şewitandim û perçiqandim û heta
ku bibe mîna tozê wê baş eciqan-
dim û toza wê avêtim newala ku ji
çiyê ve dadikeve.
22 Û li Taberayê û li Massayê û
li Kîbrot-Hattaavayê, we XU-
DAN hêrs kirin. 23 Û dema XU-
DAN bi gotina: Herin û welatê ku
dayîme we bi milkî bistînin, we ji
Kadeş-Barneayê şand, we li dijî
emrê Xwedayê xwe XUDAN serî
hildan û we baweriya xwe bi wî
neanîn û gotina wî guhdarî neki-
rin. 24 Ji roja ku ez bi we dizanim,
hûn li dijî XUDAN asê bûn.
25 Û xwe li ber XUDAN avêtim
erdê û çel roj û çel şevî li erdê ve
girtî mam, ji ber XUDAN gotibû
ku, dê ew ê we helaq bike. 26 Û
lava ji XUDAN re kirim û gotim:
Ya Xudan, XUDAN! Netewe û
mêrasa xwe, ya ku te bi mezinti-
ya xwe xelas kiriye û bi destê bi
qudret ve ji Misirê derxistiye he-
laq neke! 27 Qûlên xwe, Birahîm,
Îshaq û Aqûp di bîra xwe de bîne;
li tundiya vê netewê û li xerabiya
wê û li sûcê wê nenihêre, 28 da
ku, welatê ku te me ji wir derxisti-
ye bila nebêje: Ji ber ku XUDAN
hêz neanî ku wan bibe welatê ji
wan re wad kiriye û ji ber ku ji
wan dikerihe, bona ku li çolê wan
bukuje, wan derxist! 29 Lê belê
ew netewe û mêrasa te, ya ku te bi
qudreta xwe yî mezin û milê xwe
yî dirêjbûyî derxistiye ne!

*Mûsa dîsa Emiran distîne*

2.Mûs 34

10 Wê gavê XUDAN ji min
re got: Ji xwe re mîna yên
berê du lewhayên kevirî biqeşêre
û hilkişe çiyê, cem min û ji xwe
re ji dar sindoqekê çêbike. 2 Û ez
ê gotinên li ser lewhayên berê yên
ku te wan perçe kirine, li ser van
lewhayan binivîsînim û tuyê wan
bixe sindoqê! 3 Û ji darcêwiyê sin-
doqê çêkirim û du heb lewhayên
kevirî mîna yên berê qewartim û
hilkişiyam çiyê û her du lewha di
destê min de bûn. 4 Û deh emirên
ku XUDAN roja civandinê li çiyê
ji nav agir ve ji we re gotine, mîna
nivîsa berê li ser lewheyan nivî-
sandin û XUDAN wan da min. 5
Û ez vegeriyam û ji çiyê daketim û
lewhayan xistim sindoqa ku çêki-
rime û ew, mîna ku XUDAN emir
daye min di wir de ne. 6 Û lawên
Îsraêl ji Beerot-Bene-Yaakanê
koçî Moserayê kirin. Harûn li wir
mir û li wir hate binax kirin û lawê
wî Eleazar li dêvila wî kahîntiyê
kir. 7 Ji wir koçî Gûdgodayê, ji
Gûdgodayê berbi Yotbataya ku
warê newalên diherikin koç kirin.
8 Wê gavê bona kişandina Sindo-
qa Peymanê ya XUDAN û bona
ku heta îroj xizmetê ji XUDAN
re bikin li ber wî bisekinin, bona
ku bi navê wî ve wan pîroz bikin,
XUDAN ezbeta Lêwî cihê kir. 9
Ji ber vê yekê par û mêrasa Lêwi-
yiyan bi birayên wan re tune ne;
mîna ku Xwedayê te XUDAN jê
re gotiye, mêrasa wan XUDAN e.
10 Û ez mîna rojên berê, çel roj û
çel şev li çiyê mam û XUDAN vî
carî jî min guhdarî kir; XUDAN
nexwest ku te helaq bike. 11 Û
XUDAN ji min re got: Rabe, bona
koçê ji pêşiya netewê ve bimeşe
û dê bikevin welatê, ya bona ku
ez bidim wan, min ji bapîrên wan
re sondê dayiye û dê wê bi milkî
bistînin.

*Ji Xudan bitirsin*

5.Mûs 7,6-11; Zeb 146

12 Û niha, ya Îsraêl, xeynî ji Xwe-
dayê xwe XUDAN ve tirsîn û di
hemû rêyên wî de meşandinê û ji
wî hezkirinê û bi hemû dil û canê
xwe, ji Xwedayê xwe XUDAN
re xizmetê kirinê, 13 xeynî girti-
na emir û zagonên XUDAN yên
ku îroj bona qenciya te, ez ji te re
emir didim, Xwedayê te XUDAN
ji te çi dixwazî? 14 A vay, ezman
û ezmanên ezmanan, erd û her
tiştên di wê de ne, yê XUDANê ku
Xwedayê te ye ne. 15 Lê XUDAN
ji bapîrên te xoşnûd bû, ji wan
hezkir û paşî wan nîjadên wan, we
mîna ku îroj wusa ye, ji nav hemû
neteweyan ve hilbijart. 16 Bo vê
yekê gûlfeyê[1] dilê xwe sunet bikin,
êdî nebin histu hişk! 17 Ji ber ku

[1] Çermikê sunetê.

Xwedayê we XUDAN, ew, Xwe-
dayê îlahan û Xudanê xudanan,
Xwedayekî mezin, bi qudret û
bisawêr, ê ku kesan nahesibîne û
bertîlê nastîne ye. 18 Bona sêwî
û pîreka bî dadiyê dike û bi nan û
kinc dayînê ji yê xerîb hez dike.
19 Hûn jî ji yê xerîb hez bikin; ji
ber ku hûn li welatê Misirê xerîb
bûn. 20 Tuyê ji Xwedayê xwe XU-
DAN ve bitirse; jê re qûlitiyê bike
û tuyê pê ve bizeliqe û bi navê wî
ve sondê bide. 21 Ew pesna te ye
û Xwedayê te, yê ku van tiştên ça-
vên te dibîne, ên mezin û bi sawêr
çêkirine ye. 22 Bapîrên te bi heftê
canî daketin Misirê û niha Xwe-
dayê te XUDAN te di pirraniyê de
kir mîna sitêrkên ezmanê!

*Mezinahiya Xudan*

11 Û tuyê ji Xwedayê xwe XU-
DAN ve hez bike û di hemû
rojan de bi temmiya wî û zagonên
wî, darazî û emirên wî bigire. 2 Û
îroj bizanibin; ji ber ku ez bi lawên
we re naaxifim, ew perwerde kirina
Xwedayê we XUDAN, mezintiya
wî, destê wî yê biqudret û milê wî
yê dirêj bûyî 3 û elamet û karên wî,
yên ku li Misirê li dijî qiralê Misirê
Fîrawûn û hemûya welatê wî kiri-
ne 4 û ka çi bi artêşa Misirê ve û
li hespên wan û li erebeyên wanî
cengê kirine, dema li pêy we bera
we didan çawa avên Behra Gewez
bi ser wan ve anîne û ka çawa XU-
DAN wan heta îroj tune kiriye 5 û
heta ku hûn hatine vir li çolê ka çi bi
we kiriye 6 û çi bi Datan û Abîramê
lawên Elîabê lawê Rûben e kiriye, li
nava hemûya Îsraêlê erd çawa devê
xwe vekiriye û çawa wan û maliyên
wan û konên wan û her tiştên zindî
yên ku li pêy wan tên daqûrtandine
nedîtin û pê nizanin; 7 lê belê çavên
we, hemû karên mezin ên ku XU-
DAN kiriye dîtin.
8 Û îroj hûn ê bi her emrê ku didim
we bigirin, da ku, hûn xwurt bibin
û bikevin welatê ku hûn bona bi
milkî bistînin derbasî wê dibin û
wê ji xwe re bikin milk 9 û bila li
welatê tê de hungiv û şîr diherikin
yê ku, XUDAN bona bide
bapîrên we û nîjadên we ji wan re
sond dayiye, temena we dirêj be.
10 Ji ber welatê ku bona hûn ji xwe
re bikin milk dikevinê, ne mîna
welatê Misirê ye; te yê li wir tova
xwe biçanda û te mîna bostanê
sewzî bi lingê xwe ve avê didayê;
11 lê belê welatê ku bona tu ji
xwe re bi milkî bistîne derbasî wê
dibe, welatê çem û çiyayan e û ji
barana ezmanan ve avê vedixwe.
12 Welatek, yê ku Xwedayê te
XUDAN, wê hêvişandiye; ji
serê salê heta dawiya salê çavê
Xwedayê te XUDAN her tim li
ser wê ye.
13 Û dê wusa bibe ku, ger hûn ji
Xwedayê xwe XUDAN hez bikin
û bona bi hemû dil û canê xwe jê re

qûlitiyê bikin, emirên min yên ku
îroj ez ji we re emir dikim bi qencî
guhdarî bikin, 14 wê gavê, bona ku
di wextê wê de genimê wê û xemra
wê yî nû û zeyta wê bide hev, ez ê
barana welatê we, barana pêşîn û
ya dawîn di wextê wan de bidim.
15 Û di zeviya te de, ez ê bona hey-
wanên te gîha bidim û tuyê bixwe
û têr bibe. 16 Qet mekin, bila dilê
we nexape û çewt nebin û ji îlahên
wekî din re qûlitiyê nekin û ji wan
re secde nekin 17 û bila hêrsa XU-
DAN li dijî we sor nebe û bila ba-
ran nebe û bona erd berê xwe nede,
bila ezmanan negire û hûn ji ser
welatê qenc ya XUDAN daye we
zû tune nebin!
18 Û hûn ê van gotinên min bi-
xin dil û canên xwe û wan wekî
elametê bi ser destên xwe ve girê
bidin û dê di nav çavên we de bi-
bin bendika eniyê. 19 Û dema tu li
mala xwe rûnişt û di rê de meşiya
û dema tu rakeve û rabe, tuyê di
derheqê wan de biaxife û wan hînî
lawên xwe bike. 20 Û tuyê wan
li ser sitûnên deriyê mala xwe
û li ser deriyên xwe binivîsîne;
21 da ku, li welatê ku XUDAN
bona bide bapîrên we sond dayi-
ye, rojên we û rojên lawên we li
ser erdê qasî rojên ezmanan zêde
bin. 22 Ji ber, ger bona kirina
hemû vî emrê ku ez ji we re emir
dikim, hûn ji Xwedayê xwe XU-
DAN hez bikin û di hemû rêyên
wî de bimeşin û bi wî ve bizeliqin,
bi zexmî pê bigirin; 23 wê gavê dê
XUDAN hemû van neteweyan ji
ber we biqewirîne û hûn ê milkên
neteweyên ku ji we mezintir û
xwurttir in bistînin. 24 Her derên
ku navkoyên lingên we pêlêkin, dê
bibin yên we; sînorê we ji çolê û ji
Lubnanê, ji çem, dê ji çemê Feratê
heta behra rojavayê be. 25 Dê tu
kes nikaribe li ber we bisekine,
Xwedayê we XUDAN, mîna ku ji
we re gotiye, dê tirsa we û toqîna
we deyne ser hemû welatê ku hûn
lingên xwe bavênê.
26 Binêrin, ez îroj bereketê û naletê
datînim ber we; 27 ger hûn emirên
Xwedayê xwe XUDAN, yên ku îroj
ez ji we re emir dikim guhdarî bikin,
hûn ê bi bereket bin 28 û ger emirên
Xwedayê xwe XUDAN guhdarî
nekin û bona ku li pêy îlahên ku
hûn bi wan nizanin ji rêya ku îroj
ez ji we re emir dikim çewt bibin,
bi nalet bin. 29 Û dê wusa bibe
ku, dema Xwedayê te XUDAN, te
bîne welatê ku hûn bona bi milkî
bistînin diçinê, tuyê bereketê deyne
ser çiyayê Gerîzîmê û naletê dey-
ne ser çiyayê Ebalê. 30 Ma ew ne
ji Urdunê wêdetir, li paşî rêya ku
roj diçe ava, li welatê Kenaniyên
ku li Arabayê rûdinin, li hemberî
Gîlgalê, li cem darçiloyên Moreyê
ne? 31 Ji ber, bona ku hûn ji xwe re
bikin milk, bikevin welatê ku Xwe-
dayê we XUDAN daye we, hûn ê

ji Urdunê ve derbas bibin û wê ji
xwe re bikin milk û di wê de rûnin.
32 Û bona ku bikin[1] hûn ê bi hemû
zagon û daraziyên ku îroj datînim
ber we, bigirin!

*Cîhê Peristinê yê tekane*

2.Qir 18,1-6

12 Li welatê Xwedayê bapîrên
te XUDAN, bona ku tu ji
xwe re bike milk daye te, zagon
û daraziyên ku di hemû rojên hûn
ê li rûyê erdê ve bijîn de, bona ku
wan bînin cîh bigirin ev in. 2 Divê
muheqeq hûn hemû cîhên ku nete-
weyên hûn ê milkên wan bistînin
li ser çiyayên bilind û li ser giran
û di bin her darê hêşîn de ji îlahên
xwe re peristinê dikirin, xera bikin
3 û pêşkêşîgehên wan xera bikin
û kevirên wanî çikandî biperçi-
qînin û hûn ê Aşerên wan di agir
de bişewitînin û pûtên qewartî yên
îlahên wan bidin ber bivir û ji wê
derê navên wan tune bikin. 4 Hûn ê
ji Xwedayê xwe XUDAN re wusa
nekin. 5 Lê belê hûn ê li cîhê ku
Xwedayê we XUDAN bona ku
navê xwe deyne wir ji hemû ez-
betên we hilbijêre û li şunwara wî
bigerin û tuyê were wir 6 û hûn ê
pêşkêşiyên xwe yî şewitandinê û
qurbanên xwe û dehekên xwe û
pêşkêşiya rakirinê ya destê xwe
û qewlên xwe û pêşkêşiyên xwe
yên ji dil û pêşîbûyiyên dewar û
keriyên xwe bînin wir 7 û li wir, li
ber Xwedayê xwe XUDAN hûn ê
bixwin û hûn û maliyên we, di her
karê ku hûn destê xwe bavêjinê û
Xwedayê we XUDAN we tê de
pîroz kirine de, kêfxweş bibin.
8 Hûn ê li gor hemû tiştên ku îroj
em li vir çê dikin nekin; her kes
ya ku di çavê xwe de rast e dike;
9 ji ber ku hîn hûn neketin rawes-
tin û mêrasa ku Xwedayê we XU-
DAN dayiye we. 10 Lê belê hûn
ê ji Urdunê ve derbas bibin û di
wî welatê ku Xwedayê we XU-
DAN bi mêrasî bide we de, hûn
ê rûnin û dê bi dor û ber ji hemû
neyarên we ve rehetiyê[2] bide we
û hûn ê di ewlekariyê de rûnin;
11 wê gavê dê wusa bibe ku, hûn
ê her tiştên ku ji we re emir kiri-
me, pêşkêşiyên xwe yî şewitandinê
û qurbanên xwe, dehekiyên xwe û
pêşkêşiya rakirinê ya destê xwe û
hemû pêşkêşiyên we yî bijartî, yên
ku we ji XUDAN re qewil kirine ji
cîhê ku Xwedayê we XUDAN bi
şunwarî ji xwe re hilbijêre bînin,
hûn ê bînin wê derê. 12 Û li ber
Xwedayê xwe XUDAN hûn û
lawên we û qîzên we û dîlên we û
cariyeyên we û Lêwiyiyê ku di de-
riyê we de ne, hûn ê kêfxweş bibin,
ji ber ku par û mêrasa Lêwiyî bi we
re nîne. 13 Nebe ku, tu pêşkêşiyên

1 An jî: Bînin cîh.

2 Aramiyê.

xwe yî şewitandinê li her cîhê ku
bibîne pêşkêş bike; 14 lê belê tuyê
pêşkêşiyên xwe yî şewitandinê li
cîhekî XUDAN yek ji ezbetên xwe
hilbijêre, pêşkêş bike û her tiştên
ku emirên wan li te kirime tuyê li
wir bike.
15 Lê li gor bereketa ku Xwedayê
te XUDAN daye te, yê ku canê te
dixwaze her çi be, tu dikarî li hemû
bajarên xwe serjê bike û bikaribe
goşt bixwe; zilamê mindar û zi-
lamê paqij, dikare mîna ku xezal
û pezkûvî çawa tête xwarin wusa
bixwe. 16 Lê tuyê xwînê nexwe;
tuyê wê mîna avê bi erdê ve birijî-
ne. 17 Tu nikare dehekiya genimê
xwe û xemra xwe yî nû û zeyta
xwe û pêşîbûyiyên dewar û keri-
yên xwe û tu yên qewlên ku te qe-
wil kirine û pêşkêşiyên te yî ji dil û
pêşkêşiya rakirinê ya destê xwe di
bajarên xwe de bixwe; 18 lê belê
tu û lawê te û qîza te û dîlê te û ca-
riya te û Lêwiyiyê ku di bajarên te
de yî, wan li ber Xwedayê te XU-
DAN, li cîhê ku Xwedayê te XU-
DAN hilbijartiye bixwe û tuyê di
her tiştê ku te li ber Xwedayê xwe
XUDAN dest avêtiyê de dilxweş
bibe. 19 Bala xwe bide ku di rojên
tu di welatê xwe de bijî de, dev ji
Lêwiyî bernede!
20 Dema mîna ku ji te re wad ki-
riye Xwedayê te XUDAN sînorên
te fireh kir, bona canê te xwest ku
goşt bixwe, tu: Ez ê goşt bixwim
bibêje; tu dikare li gor her xwes-
teka dilê xwe goşt bixwe. 21 Ger
cîhê ku Xwedayê te XUDAN
bona navê xwe lêke hilbijêre ji
te zehf dûr be, wê gavê ji dewar
û keriyên ku XUDAN dane te,
li gor ku ez emir bikim, tuyê ser
jê bike û li gor hemû daxwaziya
dilê xwe tu dikarî li bajarên xwe
bixwe. 22 Xezal û pezkûvî çawa
bên xwarin, tuyê ji wê bitûmî
wusa bixwe; zilamê mindar û zi-
lamê paqij dikare wekhev wusa
bixwin. 23 Lê belê xwe baş bi-
parêze ku, tu xwînê nexwe; ji ber
ku xwîn can e û tuyê can bi goşt
re nexwe. 24 Tuyê wê nexwe,
wê mîna avê bi erdê ve birijîne.
25 Dema te ya ku di çavê XUDAN
de rast e kir, bona ku ji te re û li
pêy te ji zarokên te re bibe qencî,
tuyê wê nexwe. 26 Lê tiştên wê yî
pîroz yên di te de ne û qewlên wê
tuyê rahêle û here cîhê ku dê XU-
DAN hilbijêre 27 û pêşkêşiyên
xwe yî şewitandinê goşt û xwînê
tuyê li ser pêşkêşîgeha Xwe-
dayê xwe XUDAN ve pêşkêş
bike û dê xwîna qurbanan bi ser
pêşkêşîgeha Xwedayê te XUDAN
ve bête rijandin û tuyê goşt bixwe.
28 Dema tu ya ku di çavê Xwe-
dayê xwe XUDAN de qenc e bikî,
bona ji te re û li pêy te ji lawên
te re bibe qenciya abadîn, hemû
van gotinên ku ji te re emir dikim,
guhdarî bike û bi wan bigire.

*Ji Îlahên wekî din re Peristinê nekin*
5.Mûs 27-30
29 Dema Xwedayê te XUDAN
neteweyên ku tu bona bi milkî
bistîne diçe ji ber te rakir û avêt
û dema te milkên wan stend û li
welatên wan rûnişt; 30 xwe bi-
parêze ku, paşî ew ji ber te helaq
bûne bona ku tu li pêy wan bimeşe
û bikeve dafikê û bi gotina: Ka ev
netewena çawa ji îlahên xwe re
qûlitiyê dikin? ez jî wusa bikim
li îlahên wan negere. 31 Tuyê ji
Xwedayê xwe XUDAN re wusa
neke; ji ber ku wan her tiştê mek-
rûhê ku XUDAN jê dikerihe ji
îlahên xwe re kirin; ji ber ku ji
îlahên xwe re lawên xwe û qîzên
xwe jî di agir de dişewitînin.
32 Tuyê hemû tiştên ku ji te re
emir dikim, bona ku bike, bi wan
bigire, tu tiştî bi ser wan ve nexe
û ji wê kêm neke.

*Îkazên li dijî peyxamberên sexte*
5.Mûs 18,9-14; Yêr 23,9-40; Met 24,24;
2.Sel 2,9-12; 2.Pêt 2,1-3; 1.Yû 4,1-6; Gal 1,8

13 Ger di nav we de peyxambe-
rek an jî yekî ku xewnê bibî-
ne derkeve û ger nuwazeyek, an jî
elameteke bide te 2 û ger elamet, an
jî nuwazeya ku bi gotina: Em li pêy
îlahên ku bi wan nizanin bimeşin û
qûlitiyê ji wan re bikin di derheqê
wan de gotiye çêbibe; 3 hûn ê go-
tina wî peyxamberî an jî ew ê ku
xewnê dîtiye guhdarî nekin; ji ber
ku bi gotina: Ka hûn bi hemû dil
û hemû canê xwe ji Xwedayê we
XUDAN ve hez dikin? bizanibe,
Xwedayê we XUDAN we diceribî-
ne. 4 Hûn ê li pêy Xwedayê xwe
XUDAN ve bimeşin û jê bitirsin û
bi emirên wî ve bigirin û gotinên wî
guhdarî bikin û jê re qûlitiyê bikin û
pê ve bizeliqin. 5 Û ew peyxamber
an jî ew ê ku xewnê dîtiyê, dê bête
kuştin; ji ber, bona rêya ku Xwe-
dayê we XUDAN tê de meşînê ji
we re emir kiriye we bikişîne, li dijî
Xwedayê we XUDAN yê ku we ji
welatê Misirê ve derxistiye û we ji
mala dîlitiyê xelas kiriye rêşaşiyê
gotiye. Bi vî awayî hûn ê xerabiyê
ji nav xwe ve bavêjin.
6 Ger birayê te, lawê diya te, an jî
lawê te, an jî qîza te, an jî jina te ya
ku di ber sînga te de yî, an jî hevalê
te yî mîna canê te, bona ku bi dizîka
te ji rê ve derxîne di derheqê îlahên
neteweyên ku tu û bapîrên xwe
pê nizanin de, 7 li dora we ne, ji
seriyekî dinê heta seriyê wê yî din
nêzîkî te an jî dûrî te ye bibêje: Em
herin û ji îlahên wekî din re qûlitiyê
bikin; 8 tuyê li gor wî neke û wî
guhdarî neke û dê heyfa te lê neyê
û divê tu neparêze û wê veneşêre;
9 lê belê tuyê muheqeq wî bukuje;
bona ku tu wî bukuje pêşiyê destê
te, dawiyê destê hemûya netewê dê
li ser wî be. 10 Û bona ku bimire
tuyê bi kevir ve wî birecimîne,
ji ber ku bona te ji Xwedayê te

XUDAN yê ku te ji welatê Misirê,
ji mala dîlitiyê derxistiye bikişîne[1],
xebitiye. 11 Û dê hemûya Îsraêlê
bibihîzin û bitirsin û carekî din di
nav we de tiştekî mîna vêya xerab
dê nekin.
12 Ger tu bibihîze ku ji bajarekî
bajarên ku Xwedayê te XUDAN
bona rûniştinê daye te: Ji nav we
hinek zilamên pêxwas derketin
13 û bi gotina: Em herin û îlahên
wekî din ên ku em bi wan nizanin
gelên bajarên te kişandin tête go-
tin; 14 wê gavê tuyê lêbigere û lê-
kolînê lê bike û baş bipirse û a vay,
ger rastî be û di nav we de kirina
ev tiştê mekrûh bête îspatkirinê[2],
15 tuyê muheqeq gelê wî bajarî ji
şûr ve derbas bike, wê û her tiştên
di wê de ne û heywanên wê bi tûmî
tune bike. 16 Û tuyê hemûya malên
wê yî talanê li nav kuçê kom bike û
tuyê bajêr û hemûya malên wê yên
talanê bi agir ve ji Xwedayê xwe
XUDAN re bişewitîne û dê bibe
komekî abadîn û dê êdî neyê çêki-
rin. 17 Tu tiştên ku dê bên tune ki-
rin, bi destê te ve nezeliqin; da ku,
bona tu ya ku di çavê Xwedayê te
XUDAN de rast e bike, ji bo tu bi
hemû emirên XUDAN ên ku îroj
ez ji te re emir dikim bigire! 18 Ger
tu gotina XUDAN guhdarî bike,
bila hêrsa XUDAN ji xeyda xwe
vegere û mîna sond dayiye bapîrên
te, bila dilovaniyê li te bike û heyfa
wî li te bê û te zêde bike.

*Heywanên ku goştên wan têne xwarin û yên ku nayên xwarin*

14 Hûn zarokên Xwedayê
xwe XUDAN in; hûn ê
bona mirî di bedena xwe de birînê
venekin û navbera çavên xwe
bêyî mû nehêlin. 2 Ji ber ku tu ji
Xwedayê xwe XUDAN re nete-
weyek pîroz e û XUDAN wekî ji
hemû neteweyên ku li ser erdê ne,
seretetir be, te ji xwe re bona ku tu
bibe neteweyek mexsûsî hilbijart.
3 Tuyê tu tiştekî ku mekrûh e ne-
xwe. 4 Heywanên ku hûn ê bikari-
bin bixwin vana ne: Dewar, mîh û
bizin, 5 pezkûvî û xezal û gakûvî û
bizina çiyayan û ask û ahû û mîha
bejî. 6 Û hûn dikarin di nav heywa-
nan de her yê ku simê wan qelişî
û yên simê wan çetelî ne û kawêjê
dikin, bixwin. 7 Lê belê hûn ê ji
nav yên kawêjê dikin, an jî simê
wan qelişî ne vana nexwin: Deve û
kîroşk û kurbeşka zinarê, ji ber ku
kawêjê dikin, lê belê ne sim[3] qelişî
ne, ew ji we re mindar in 8 û be-
raz, ji ber ku sim qelişiye, lê belê
kawêjê nake; ew ji we re mindar e;
hûn ê ji goştên vana nexwin û destê
xwe bi laşên wan ve nedin.

[1] Bo dûr xistinê, an jî: Bo çepandinê xebitiye.
[2] Peyitandî, pêdandî, yanê ger rast û eşkere be.
[3] Neynûk.

9 Ji hemû heywanên ku di avê de
ne, hûn dikarin vana bixwin: Hûn
dikarin hemûyên bi perik û bi pûl
bixwin 10 û hemûyên ku bêpe-
rik û bêpûl in nexwin; ev ji we re
mindar in.
11 Hûn dikarin hemû civîkên paqij
bixwin. 12 Lê belê yên ku hûn ê
ji wan nexwin vana ne: Qertel û
başok û çûkreş 13 û bet û teyrê
baz û li gor celebê wê kulemar
14 û li gor celebên xwe hemûyên
qijokan 15 û heştirme û kund û
pepûk û li gor celêbê xwe waşe,
16 kundê biçûk û kundê mezin û
qaza iraqî 17 û zengilok û sîqalk û
kersele 18 û legleg û li gor celebê
xwe şîrînşaho[1] û tûka dimdim û
şevrevînk. 19 Û hemû bûxikên bi
perik ji we re mindar in; dê neyên
xwarin. 20 Hûn dikarin hemû ci-
vîkên paqij bixwin.
21 Hûn ê qet laş nexwin; bona ku
wê bixwe, tu dikarî wê bide xe-
rîbê ku di bajarên te de yî; an jî
dikarî bifroşe biyanekî; ji ber ku
tu ji Xwedayê xwe XUDAN re
neteweyek pîroz e. Tuyê karikê di
şîrê diya wê de nekelîne.

*Qaîdeyên di derbarê dehekan de*

5.Mûs 26,12-15; Male 3,10-12

22 Tuyê muheqeq dehekiya
hemûya berê tova ku ji salê heta
salê di zeviyê de derdikeve, bide.
23 Û bona ku tu her tim hînî
ji Xwedayê xwe XUDAN ve
tirsînê bibe, tuyê dehekiya ge-
nimê xwe û xemra xwe û zeyta
xwe û pêşîbûyiyên dewar û ke-
riyên xwe, li ber Xwedayê xwe
XUDAN, li cîhê ku ew ê bona ji
navê xwe re bike şunwar hilbijê-
re bixwe. 24 Dema Xwedayê te
XUDAN bereketê bide te, ji ber
ku cîhê Xwedayê te XUDAN
bona ji navê xwe re bibe şunwar
hilbijêre ji te re dûr e, ger rê qasî
ku tu nikaribe wê bikşîne dirêj be,
25 wê gavê tuyê wê bike pere û
tuyê pere di destê xwe de bike
buxçe û tuyê here cîhê ku Xwe-
dayê te XUDAN hilbijêre 26 û
tuyê pere li gor her tiştê ku canê
te bixwaze, bona dewaran û bona
mîhan û bona xemrê û bona ve-
xwarinê û bona her tiştê ku canê
te ji te bixwaze bide û tuyê li wir li
ber Xwedayê xwe XUDAN bixwe
û tu û maliyên te hûn ê kêfxweş
bibin. 27 Û tuyê dev ji Lêwiyiyê
ku li bajarên te ye bernede; ji ber
ku par û mêrasa wî bi te re nîne.
28 Tuyê li dawiya her sê salan, di
wê salê de hemûya dehekiya zadê
xwe derxîne û di bajarên xwe de
kom bike 29 û bona ku bi te re
par û mêrasa wî nîne dê Lêwiyî û
xerîbê ku li bajarên te ne û sêwî û
jinebî werin û bixwin û têr bibin;
da ku, Xwedayê te XUDAN di her
karê ku tu dike de te pîroz bike.

1 Masîgir, masîxur.

*Sala ku dê deyn bêne bexşandin*
3.Mûs 25

15 Tuyê li pêy her heft salî
bangewaziyekê bike. 2 Û
bangewazî bi vî awayî dibe: Dê
her yê ku deyndar, tiştê ku bi deyn
daye cîranê xwe pêşkêş û eşkere
bike; dê tengasiyê nede cîranê xwe
û birayê xwe; ji ber ku bangewa-
ziya XUDAN hatiye bang kirin.
3 Tu dikarî tengasiyê bide yê bi-
yan; lê belê her tiştên te yê bi bi-
rayê te re yî dê destê te bi bange-
wazitî bike. 4 Tevî vêya dê di te de
xizan tune be; ji ber ku di welatê
ku Xwedayê te XUDAN bona tu
wê bi milkî bistîne bi mêrasî dide
te de, 5 tu van emirên ku îroj ji te
re emir dikim bona ku bike bi wan
bigire, tu bi qencî gotina Xwe-
dayê xwe XUDAN guhdarî bike,
dê XUDAN muheqeq te pîroz
bike. 6 Ji ber, mîna ku Xwedayê
te XUDAN ji te re wad kiriye dê
te pîroz bike û tuyê bi deyn bide
gellek neteweyan, lê belê tuyê bi
deyn nestîne û tuyê serweriyê li
gellek neteweyan bike, lê belê dê
ew li ser te serweriyê nekin.
7 Di welatê te de yê ku Xwedayê
te XUDAN dide te, ger yek ji bi-
rayên te, zilamekî xizan li cem
te, di deriyekî te de be, tuyê dilê
xwe hişk neke û destê xwe ji bi-
rayê xwe yî xizan re negire; 8 lê
belê tuyê muheqeq destê xwe jê re
veke û di tiştê ku ew motajî wê ye
de muheqeq qasî motajiya wî tuyê
bi deyn bide wî. 9 Nebe ku, bila di
dilê te de bi gotina: Sala heftemîn,
sala bangewaziyê nêzîk e! rama-
nek ji rêzê tune be û bila li dijî
birayê te yî xizan çavê te xerab
nebe û tu tiştekî mîna nedana wî
neke û dema li dijî te ji XUDAN
re bang bike, bila ji te re nebe sûc!
10 Tuyê muheqeq bide wî û dema
tu bide wî, dê dilê te bi keserê
nekeve; ji ber ku di hemû karên te
de û di her tiştê ku tu dest bavêje
de Xwedayê te XUDAN ji ber vê
yekê dê te pîroz bike. 11 Ji ber
ku di hundirê welêt de xizan kêm
nebe; bona vê ez bi gotina: Mu-
heqeq tuyê li welatê xwe ji birayê
xwe re, ji kêm û ji xizanê xwe re
destê xwe veke emir didim te.

*Di derbarê dîlên Îbranî de*
2.Mûs 21,1-11

12 Ger birayê te, mêrekî Îbranî an
jî jinekî Îbranî ji te re bête firotan
û şeş sal dîlitiyê ji te re bike, wê
gavê tuyê di sala heftemîn de wî
ji cem xwe bi azadî serbest berde.
13 Û dema te bi azadî wî ji cem
xwe serbest berda, tuyê wî bi dest
valayî bernede; 14 ji keriyê xwe û
ji bêndera xwe û ji mahsera xwe
tuyê bi comerdî bide wî; Xwedayê
te XUDAN çawa bereketê dabe te,
tuyê bi vî awayî bide wî. 15 Û tuyê
li welatê Misirê dîlbûna xwe û xe-
las kirina Xwedayê xwe XUDAN

di bîra xwe de bîne; bona vê yekê
ez îroj vî tiştî ji te re emir dikim.
16 Û dê wusa bibe ku, ger ji ber ji
te û ji mala te hez dike û li cem te
rehet e: Ez ji cem te dernakevim
bibêje, 17 wê gavê tuyê dirêşkekê
rahêlê û wî ji guhê wî bi derî ve
biçikîne û dê abadîn ew bibe dîlê
te. Û tuyê ji cariya xwe re jî wusa
bike. 18 Dema tu bi azadî wê ji
cem xwe berde, dê ji çavê te re zor
neyê xuya kirin; ji ber ku şeş sal
qasî du qatê rojaneya rojanîvan ji
te re xizmetê kiriye û dê Xwedayê
te XUDAN di her karê ku tuyê
bike de, te pîroz bike.

*Heywanên ku pêşiyê zayîne*

2.Mûs 13,11-16

19 Di dewar û keriyên xwe de her
nêrê pêşiyê bûyiye tuyê ji Xwe-
dayê xwe XUDAN re pîroz bike;
tuyê bi pêşî bûyiyên dewarên
xwe re kar neke û pêşî bûyiyê
keriyên xwe nequsîne. 20 Tu û
maliyên te, li ber Xwedayê xwe
XUDAN, li cîhê ku XUDAN hil-
bijêre ji salê heta salê wê bixwin.
21 Û ger di wê de qisûrek hebe,
kûd an jî kor be, her yek qisûrek
xerab hebe, tuyê wê ji Xwedayê
xwe XUDAN re qurban neke.
22 Di deriyên te de zilamê min-
dar û zilamê paqij bê cihêtî, mîna
pezkûvî û xezal tête xwarin hûn ê
wê bixwin. 23 Lê tuyê xwîna wê
nexwe; tuyê wê mîna avê bi erdê
ve birijîne.

*Cejna Fisihê*

2.Mûs 12,1-28

16 Bi meha Abîbê bigire û ji
Xwedayê xwe XUDAN re
bike Fisih; ji ber ku Xwedayê te
XUDAN di meha Abîbê de, şevê
te ji Misirê ve derxist. 2 Û li cîhê
ku XUDAN ji navê xwe re bona
ku bibe şunwar hilbijêre, tuyê ji
keriyan û ji dewaran ji Xwedayê
xwe XUDAN re Fisihê qurban
bike. 3 Tuyê pê re nanê bihavên
nexwe; bona ku di tûmiya rojên
jiyana xwe de tu roja ku ji welatê
Misirê ve derketiye di bîra xwe
de bîne, tuyê pê re heft roj nanê
bêhavên, nanê zebûniyê bixwe;
ji ber ku tu bi lezî ji welatê Mi-
sirê ve derket. 4 Û dê heft roj di
hundirê hemûyê sînorên te de li
cem te havên neyê xuyanî kirin û
di roja yekemîn de, êvarî, ji goştê
ku tuyê bike qurban, heta sibehê
dê di tûmiya şevê de nemîne. 5
Ji yek bajarekî bajarên Xwedayê
te XUDAN dayiye te tu nikarî
Fisihê qurban bike; 6 lê tu dikarî
Fisihê li cîhê ku Xwedayê te XU-
DAN ji navê xwe re bi şunwarî
hilbijêre, êvarî, dema roj biçe ava,
tam di wexta ku tu ji Misirê der-
ketibû de qurban bike. 7 Û tuyê
li cîhê ku Xwedayê te XUDAN

hilbijêre wê bipijîne û bixwe û sibehê vegere û here çadirên xwe. 8 Şeş roj tuyê nanê bêhavên bixwe û di roja heftemîn de dê ji Xwedayê te XUDAN re civaka pîroz bibe; tuyê kar neke.

*Cejna Hefteyan*

3.Mûs 23,15-22

9 Tuyê ji xwe re heft heb hefte bijmêre; ji wexta ku te dasê berda nav zad tuyê dest pê bike û heft heb hefteyî bijmêre. 10 Li gor bereketa ku Xwedayê te XUDAN daye te, tuyê bi baca[1] pêşkêşiya ji dil ya destê te ya ku tuyê bide, ji Xwedayê xwe XUDAN re cejna hefteyan pîroz bike 11 û li ber Xwedayê xwe XUDAN, tu û lawê te û qîza te û dîlê te û cariya te û Lêwiyiyê ku di bajarên te de ye û xerîbê ku di nav te de ye û sêwî û jinebî, hûn ê li cîhê ku Xwedayê te XUDAN bona ji navê xwe re bibe şunwar hilbijêre, kêfxweş bibin. 12 Û tuyê li Misirê dîlbûna xwe di bîra xwe de bîne û tuyê bi van zagonan ve bigire û bîne cîh!

*Cejna Haymeyan*

3.Mûs 23,33-43

13 Paşî ku tu ji bênder û mahsera xwe zadê xwe bide hev tuyê bona xwe heft roj cejna haymeyan bigire 14 û di cejna xwe de tu û lawê te û qîza te û dîlê te û cariya te û Lêwiyiyê ku di deriyên te de ye û xerîb û sêwî û jinebî, hûn ê kêfxweş bibin. 15 Li cîhê ku XUDAN hilbijêre, tuyê Xwedayê xwe XUDAN re heft roj cejnê bike; ji ber ku Xwedayê te XUDAN di hemûya zadê te de û di hemû karên destên te de dê bereketê bide te û tuyê kêfxweş bibe. 16 Di salê de sê carî, di cejna nanê bêhavên de û di cejna hefteyan de û di cejna haymeyan de, dê hemû mêrên te li ber Xwedayê te XUDAN, li cîhê ku ew ê hilbijêre xuyanî bibin û dê li ber XUDAN destên wan vala neyên xuyanî kirin; 17 li gor bereketa ku Xwedayê te XUDAN daye te, her kes, qasî ku ji destê wî tê, dê bide.

*Wezîfedarkirina Rêvebiran*

2.Dîr 19,5-11

18 Di hemû deriyên te yên ku Xwedayê te XUDAN dide te de, tuyê bona xwe li gor ezbetên xwe serweran û karmendan deyne û dê bi daraziya dadiyê serweriyê li netewê bikin. 19 Tuyê mafê çewt neke û ji şexsan re giramiyê neke û bertîlê nestîne; ji ber ku bertîl çavên yên ku bi zanyarî ne, kor dike û gotinên salihan verdigerîne[2]. 20 Bona ku tu bijî û welatê

---

[1] Bêş.

[2] Dizivirînin.

ku Xwedayê te XUDAN dide te
bi mêrasî bistîne tuyê li pêy dadi-
yê, belê, li pêy dadiyê bimeşe.
21 Tuyê li cem pêşkêşiya Xwe-
dayê xwe XUDAN ya ku tuyê
bona xwe ava bike, ji qet tu darî
Aşera neçikîne. 22 Û tuyê bona
xwe kevirê çikandî, yê ku Xwe-
dayê te XUDAN jê dikerihe,
neçikîne.

17 Û dewar an jî mîha ku
qisûra wê an jî her tiştekî
wê yî xerab heye, tuyê ji Xwe-
dayê xwe XUDAN re qurban
neke; ji ber ku ev bona Xwedayê
te XUDAN tiştekî mekrûh e.
2 Ger di nav we de ji bajarekî ji
bajarên ku Xwedayê te XUDAN
dide te, mêrek an jî jinek bona ku
êrîşî peymana Xwedayê te XU-
DAN bike, ya di çavê wî de xera-
biyê bike hebe 3 û biçe û ji îlahekî
wekî din re, an jî ji rojê re, an jî
ji heyvê re, an jî ji hemûya artêşa
ezmanan re qûlitiyê kiribe û ji
wan re secde bike, ku min emrê
wê neda 4 û ji te re bête gîhandin
û tu wê bibihîze, wê gavê tuyê bi
qencî lêkolînê lê bike û a vay, ger
rast be û li Îsraêlê kirina vî tiştê
mekrûh li cîh be, 5 wê gavê tuyê
wî mêrî an jî wê jinî, mêr an jî
jina ku vî tiştê xerab kiriye derxî-
ne deriyên xwe û tuyê bi keviran
ve wan birecimîne û dê bimirin.
6 Mêrê ku dê bimire dê bi gotina
du şahdeyî, an jî sê şahdeyî bête
kuştin; dê bi gotina şahdeyekî
neyê kuştin. 7 Bona ku wî bukuje,
dê pêşiyê destê şahdeyan û paşî
wê destê hemûya netewê li ser wî
bin. Bi vî awayî tuyê xerabiyê ji
nav xwe rake.
8 Ger di bajarên te de wekî ben-
dên keftûleftê, di navbera xwîn û
xwînê de, di navbera doz û dozê
de, an jî di navbera şer û pevçûnê
de bona te tiştekî gellekî bi zeh-
met, ê ku tu darazî bike hebe; wê
gavê tuyê rabe û hilkişe cîhê ku
Xwedayê te XUDAN dê hilbijêre
9 û tuyê were cem kahînan, Lêwi-
yiyan û yê ku di wan rojan de dad-
ger[1] e û lêkolînê bike û dê biryara
daraziyê ji te re bête gîhandin.
10 Û tuyê li gor biryara ku ji cîhê
XUDAN hilbijêre bighînin te bike
û tuyê bala xwe bide ku li gor her
tiştên ku hînî te kirine tu bike;
11 li gor zagona ku hînî te bikin û
li gor daraziya ku ji te re bibêjin
tuyê bike; ji biryara ku gîhandi-
ne te, tuyê bi rastê an jî çepê ve
çewt nebe. 12 Û her kî, kahîn an
jî serwerê ku bona ji Xwedayê te
XUDAN re xizmetê bike, li wir
disekine guhdarî neke û bi kanci-
yê bike, dê ew zilam bimire û tuyê
ji Îsraêlê ve xerabiyê rake. 13 Û
dê hemûya netewê bibihîzin û bi-
tirsin û êdî kanciyê nekin.

1 Darazker, dadrês.

*Qaîdeyên di derbarê qiral de*
1.Sam 8
14 Dema tu were welatê ku Xwe-
dayê te XUDAN dide te û tu wê
milk bike û li wir rûne û: Mîna
hemû neteweyên ku li dora min
in, ez ê qiralekî deynim ser xwe
bibêje; 15 muheqeq tuyê zilamê
ku Xwedayê te XUDAN hilbijêre
bi qiralî deyne ser xwe; tuyê ji nav
birayên xwe yekî bi qiralî deyne
ser xwe; tu nikare zilamekî biyanê
ne ji birayê xwe yî deyne ser xwe.
16 Lê bona xwe dê hespan zêde
neke û bona zêde kirina hespan dê
netewê şunda venegerîne Misirê;
ji ber ku XUDAN ji we re: Êdî
carekî din hûn ê ji vê rêya ve ve-
negerin gotiye. 17 Û bona ku dilê
wî çewt nebe, dê bona xwe jinan
zêde neke û bona xwe bi zêdeyî
zîv û zêr zêde nekin.
18 Û dê wusa bibe ku, dema li ser
texta xwe yî qiraletiyê rûnê, ji ber
ya ku li ber kahînan û Lêwiyiyan,
nusxeyek vê zagonê di pirtûkekê
de binivîse 19 û dê li cem wî be
û dê di hemûya rojên jiyana xwe
de ji wê bixwîne, da ku, ji Xwe-
dayê xwe XUDAN tirsînê û bona
kirina hemû gotinên vê şerîetê û
vê zagonê, hînî girtina[1] wan bibe;
20 bila li ser birayên wî dilê wî
bilind nebe û ji emir bi rastê an
jî çepê ve çewt nebe; da ku, ew û
lawên wî, di navenda Îsraêlê de,
di welatê xwe de zehf bijîn.

*Para Kahîn û Lêwiyiyan*
4.Mûs 18

18 Dê par û mêrasa kahînan,
Lêwiyiyan û hemûya ez-
beta Lêwî bi Îsraêlê re nebe; dê
ji pêşkêşiyên XUDAN ên ku di
agir de tên çêkirin û mêrasa wî bi-
xwin. 2 Û dê di nav birayên wan
de mêrasên wan tunebin; mîna
ku XUDAN ji wan re gotiye, ew
bi xwe mêrasa wan e. 3 Û ji ne-
tewê, ji yên ku divê dewar an jî
divê mîh qurban dikin, dê mafê
kahînan ev be: Dê pîl[2] û du çeng û
hûr ji kahîn re bête dayîn. 4 Tuyê
nûberên genimê xwe û xemra xwe
û zeytê û peşma pêşîn ya mîhên
xwe bide wî. 5 Ji ber, bona ku
ew û lawên xwe her tim bi navê
XUDAN ve ji kirina xizmetê ve
bisekinin, Xwedayê te XUDAN ji
hemû ezbetên te wî hilbijart.
6 Û ger Lêwiyiyek ji bajarekî ji
bajarên te, yê ku lê mêvan e ji
hemûya Îsraêlê ve, bi hemûya
daxwazya canê xwe were cîhê ku
dê XUDAN hilbijêre; 7 wê gavê
dê mîna hemû birayên xwe Lêwi-
yiyan, yên li wir li ber XUDAN
disekinin, bi navê Xwedayê xwe

---

[1] Hînî kirina wan bibe, an jî: Hînî rîayet kirina wan bibe.

[2] Mil, çepil.

XUDAN ve xizmetê bike. 8 Xey-
nî ji ya ku ji firotana mêrasa bav
hatiye, dê para wekhev bixwin.

*Kevneşopên zişt yên Neteweyan*

3.Mûs 20

9 Dema tu were welatê ku Xwe-
dayê te XUDAN dide te, tuyê
hîn nebe ku li gor tiştên mekrûh
ên wan neteweyan bike. 10 Divê
di nav we de, yê ku law an jî qîza
xwe ji agir ve derbas kiriye, an jî
remildar, an jî sitêrknas, an jî sêr-
baz, an jî efsûnkar, 11 an jî sêhr-
ker, an jî cinkar, an jî nêrînvan,
an jî yê ku bi miriyan re dişêwire
tune be. 12 Ji ber, zilamê ku van
tiştan bike, ji XUDAN re mek-
rûh e û Xwedayê te XUDAN ji
ber van tiştên mekrûh, wan ji ber
te diqewirîne. 13 Tuyê bi Xwe-
dayê xwe XUDAN re gêhiştî[1] be.
14 Ji ber van neteweyên ku tuyê
milkên wan bistîne sitêrknasan û
remildaran guhdarî dikin; lê belê
Xwedayê te XUDAN, bona kirina
wusa te bernedaye.

*Di derbarê Peyxamberê ku dê were û peyxamberên sexte de*

K.Şa 3,22; Îbr 3,1-6

15 Dê Xwedayê te XUDAN bona
te ji nav we, ji birayên te peyxam-
berekî mîna min derxîne; tuyê wî
guhdarî bike; 16 çawa ku li Hore-
bê, di roja civandinê de, te bi go-
tina: Ez carekî din dengê Xwedayê
xwe XUDAN nebihîzim û êdî v
agirê mezin nebînim û nemirim! j
Xwedayê xwe XUDAN ve xwest
17 Û XUDAN ji min re got: Ya
ku gotin, qenc gotin. 18 Ez ê bona
wan ji nav birayên wan peyxam-
berekî mîna te derxînim û ez ê go-
tinên xwe têxim devê wî û dê her
tiştên ku jê re emir bikim ji wan re
bibêje. 19 Û dê wusa bibe ku, ez
ê ji zilamê ku gotinên min ên ku
ew ê bi navê min ve bibêje guhdarî
neke bigerim.
20 Lê peyxamberek, ger gotina
ku bona bibêje emir nedame wî bi
kancî bi navê min ve bibêje, an jî
bi navê îlahekî din ve bibêje, dê
ew peyxamber bimire! 21 Û ger
tu bi gotina: Em çawa bi gotina
ku XUDAN negotiye bizanibin?
ji dilê xwe ve bibêje; 22 dema
peyxamber bi navê XUDAN ve
bibêje û ew tişt nebe û derneke-
ve, tiştê ku XUDAN negotiye ew
e; peyxamber bi kanciyê gotiye,
tuyê jê bêzar nebe!

*Bajarên Penabergeh*

4.Mûs 35,9-34; Yêşû 20

19 Dema Xwedayê te XU-
DAN neteweyên ku Xwe-
dayê te XUDAN welatên wan
dane te bavêje[2] û dema tu di ba-

1 Kamil.

2 Tune bike, an jî: Helaq bike.

jarên wan de û di xaniyên wan
de rûnişt; 2 di navenda welatê te
yî Xwedayê te XUDAN bona ku
tu ji xwe re bike milk daye te de,
tuyê bona xwe sê bajarî cihê bike.
3 Tuyê bona xwe rêgehê amade
bike û tuyê sînorê welatê ku Xwe-
dayê te XUDAN bi mêrasî daye
te bi sê parî ve par bike, da ku, her
yê ku zilam bukuje bireve wir.
4 Û di derheqê zilam kuştiyê ku
bona sax bimîne bireve wir de,
tiştê ku bête çêkirin ev e: Zilamê
ku di derbasiyê de nefreta[1] wî ji
cîranê wî ve tune be û bi nezaniyê
lêxistibe; 5 mesela bi cîranê xwe
re, bona ku êzingan jêbike diçe
daristanê û destê wî, bona ku dar
jêbike bi bivir ve lêdixe û ger he-
sin ji destî ve derkeve û li cîranê
wî bikeve û ew bimire; dê ew ê
bireve ji van bajaran yekê û sax
bimîne; 6 ya na yê ku tola xwînê
hildidê, dema dilê wî ji hêrsê sor
be, bera pêy yê ku mêr kuştiye
dide û ji ber ku rê dirêj e, digihêje
wî û çawa ku ji ber girra wî ji
kesê ku hatiye kuştin, ji berê de
nîne, ne mistehaqê mirinê ye, li
wî dixe.
7 Bo vê yekê ji te re, bi gotina:
Tuyê bona xwe sê bajarî hilbijêre,
dibêjim. 8 Û bona ku tu ji Xwedayê
xwe XUDAN hez bike û her tim di
rêyên wî de bimeşe, ger tu bona ki-
rinê, bi hemû emirên ku îroj ji te re
emir dikim bigire, 9 ger Xwedayê
te XUDAN mîna ku ji bapîrên
te re sond dayiye sînorên te fireh
bike û hemû welatê ku dayîna wan
ji bapîrên te re wad kiribû bide te;
wê çaxê tuyê bona xwe sisiyên din
bi ser van sê bajaran ve bixî; 10 da
ku, bila di hundirê welatê ku Xwe-
dayê te XUDAN bi mêrasî dide te
de xwîna bêsûc nerije û li ser te
xwîn tune be.
11 Lê belê ger zilamek ji cîranê
xwe ve bikerihe û di kemînê de li
benda wî be û bi ser wê ve rabe
û li wî bixe û ew bimire û ew
bireve ji van bajaran bajarekî;
12 wê gavê dê kalepîrên bajarê
wî bişînin û wî ji wir rahêjin û
bona ku bimire, dê wî bidin yê
ku tola xwînê hilde. 13 Dê heyfa
te lê neyê; lê belê bona ku ji te re
bibe qencî, tuyê xwîna bêsûc ji Îs-
raêlê ve rake.
14 Di mêrasa xwe ya di welatê ku
Xwedayê te XUDAN, bona tu ji
xwe re bike milk didê te de tuyê
bistînî; cîhê sînorê cîranê xwe, yê
ku zilamên dema kevnar danîne,
tuyê neguhere.

*Di derbarê Şahdeyan de*

5.Mûs 27,17

15 Dê li dijî zilamekî, di her sûcê
ku kirine, bona her tewrê fesadiyê,
an jî sûcê dê şahdeyek ranebe; dê
bi gotina du şahdeyî, an jî bi go-

[1] Erjengiya.

tina sê şahdeyî, tiştek navdêr bibe.
16 Ger li dijî zilamekî, di derheqê
xerabiyê de bona ku şahdeyiyê
bike, şahdeyek derewçîn li dijî
wî rabe, 17 wê gavê du zilamê ku
di nav wan de doz hene, dê li ber
XUDAN, li ber kahîn û serwerên
ku di wan rojan de ne, bisekinin
18 û dê yên serwer qenc lêkolînê
lê bikin û a vay, ger şahdeyê de-
rewçîn be û li cîhê derewîn li
dijî birayê xwe şahdeyiyê kiribe;
19 wê gavê li dijî birayê xwe tiştê
ku difikirî her çi be, hûn ê bi wî
bikin û tuyê ji nav we xerabiyê
rake. 20 Û yên ku li pêy bimînin,
dê bibihîzin û bitirsin û dê êdî ca-
rekî din mîna vêya tiştekî xerab di
nav we de nekin. 21 Û dê heyfa
te lê neyê; li dêvila can, dê can, li
dêvila çav, dê çav, li dêvila diran,
dê diran, li dêvila dest, dê dest, li
dêvila ling, dê ling be.

*Dema biçin Cengê*

2.Dîr 32,6-8

20 Dema tu li dijî neyarên
xwe derkeve cengê û dema
te hespan û erebeyên cengê û
neteweyek ji te zêdetir in dît, tuyê
ji wan netirse; ji ber Xwedayê te
XUDAN yê ku te ji welatê Misirê
derxistiye bi te re ye. 2 Û dê wusa
bibe ku, dema hûn bikevin cengê,
dê kahîn nêzîk bibe û bi netewê re
biaxife 3 û ji wan re bibêje: Guhdar
bike, ya Îsraêl! hûn îro li dijî neyarên
xwe dikevin cengê; bila dilê we
sist nebin; metirsin û nelerizin û ji
wan bêzar nebin; 4 ji ber bona we
xelas bike, bona ji bo we bi neyaran
re cengê bike, yê ku bi we re diçe
Xwedayê we XUDAN e. 5 Û dê
yê serbaz bi netewê re biaxifin û
bibêjin: Yê ku xaniyê nû ava kiriye
û wê tirxan nekiriye kî heye? Bila
here û vegere mala xwe; dibe ku di
cengê de bimire û zilamekî wekî
din wê tirxan bike. 6 Û yê ku rez
çikandiye[1] û mêwa wê yî pêşîn
nedaye hev kî heye? Bila here û
vegere mala xwe; dibe ku di cengê
de bimire û zilamekî din mêwa wê
yî pêşîn bide hev. 7 Yê ku bi pîrekê
re dergistî bûye û pê re nezewiciye
kî heye? Bila here û vegere mala
xwe; dibe ku di cengê de bimire û
zilamekî din pê re bizewice. 8 Û dê
serbazan gotinên xwe bidomînin û
ji netewê re bibêjin: Kî yê ku ditirse
û li dilê xwe sist heye? Bila here û
vegere mala xwe û bila dilê birayên
wî, mîna dilê wî nehulun. 9 Û dê
wusa bibe ku, dema serbaz axaftinê
qedandin, dê serekên artêşê li ser
netewê ve wezîfedar bikin.
10 Dema bona ku tu pê re cengê
bike, nêzîkî bajarekî bibe, tuyê wî
bangî aşitiyê[2] bike. 11 Û dê wusa
bibe ku, ger bersiva aştiyê bide te û

1 Daniye.

2 Li hev hatinê.

deriyên xwe ji te re vekin, wê gavê
dê wusa bibe ku, hemû neteweya
ku di nav de ne, dê ji te re bibin sux-
rekar û qûlitiyê ji te re bikin. 12 Û
ger bi te re aştiyê neke[1] û bixwaze
ku cengê bike, wê gavê tuyê dor lê
bigire 13 û dema Xwedayê te XU-
DAN wê da destê te, tuyê her mêrên
wê bide ber şûr; 14 lê tuyê pîrekan
û zarokan û heywanan û her tiştên
li bajêr in, hemûya malên wê talan
bike û tuyê malên neyarên xwe yên
ku Xwedayê te XUDAN wan dane
destên te, bixwe. 15 Ji hemî bajarên
ku ne ji bajarên vê netewê ne û ji
te gellekî dûr in re; tuyê wusa bikî.
16 Lê belê tuyê qet kesê ku hilmê
distînin ji van bajarên ku Xwedayê
te XUDAN bi mêrasî dide te, sax
nehêle; 17 lê belê tuyê wan, Hît-
tiyan û Amoriyan û Kenaniyan û
Perîzziyan û Hîviyan û Yebûsiyan,
mîna ku Xwedayê te XUDAN ji
te re emir kiriye, bitûmî tune bike;
18 da ku, li gor hemû tiştên mek-
rûh ên ku ji îlahên xwe re çêdikin
hînî we nekin; ya na hûn ê li dijî
Xwedayê xwe XUDAN sûcê bikin.
19 Bona ku bi bajarekî re cengê
bike û wê bistîne, dema tuyê pirr
rojan dor û hêlên wê bigire, tuyê
bivir li darên wan nexe û wan
xera meke; ji ber ku tu dikarî ji
wan bixwe û tuyê wan jêneke; ji
ber ku ma darê beyarê mirov e
ku ji aliyê te dor û hêl bila lê bên
girtin? 20 Lê darên ku tu dizanî ji
wan nayê xwarin tu dikarî xerab
ke û jêbike û heta bajarê ku bi te
re cengê dike bikeve, tuyê li dijî
wê meterîsê çêbike.

*Miriyên ku kuştiyên wan nayên zanîn*
4.Mûs 35,30-34

21 Li welatê ku Xwedayê te
XUDAN bona tu ji xwe
re dike milk dide te, ger zilamekî
mirî yê li beyarê ketiye û ka ji ali-
yê kî ve hatiye lêxistin nayê zanîn
bête dîtin, 2 wê gavê dê kalepîrên
te û serwerên te derkevin û dûriti-
ya bajarên li dora zilamê ku hati-
ye kuştin bipîvin 3 û dê wusa bibe
ku kalepîrên bajarê herî nêzîkî
zilamê ku hatiye kuştin in, ji de-
waran çêlekek ciwan ya nehatiye
xebitandin û nîr li histu neketiye
rahêlin 4 û kalepîrên wî bajarî, dê
çêlekê daxînin newala ku cîhê ne-
hatiye ajotin û çandine û dê li wir,
li newalê histuyê çêlekê bişkînin.
5 Û dê lawên Lêwî, kahînan nêzîk
bibin; ji ber ku Xwedayê te XU-
DAN, bona jê re xizmetê bikin û
bi navê XUDAN ve pîroz bikin,
wan hilbijart û dê li her dozê û
di her şerê de li gor gotina wan
bibe. 6 Û hemû kalepîrên wî ba-
jarî, yên ku herî nêzîkî zilamê
hatiye kuştin in, dê li newalê, li
ser çêlekê ku histu şikestî, destên
xwe bişon 7 û dê bersivê bidin û

[1] Ger bi te re li hev hatinê neke (nexwaze).

bibêjin: Destên me vê xwînê neri-
jandin û çavên me wî nedîtin. 8 Ji
netewa xwe yî te xelas kiriye, ji
Îsraêlê re biborîne, ya XUDAN û
di nav netewa xwe Îsraêlê de xwî-
na bêsûc nehêle. Bi vî awayî dê
gunehê xwîn rijandinê li wan bête
bexşandin. 9 Û dema tu ya ku di
çavê XUDAN de rast e bikî, tuyê
xwîna bêsûc ji nav xwe rake.

*Bi Pîrekek girtî re zewac*

5.Mûs 20,10-14

10 Dema tu li dijî neyarên xwe
derkeve cengê û Xwedayê te XU-
DAN wan bide destê te û tu wan bi
dîlitî bibe, 11 ger tu di nav dîlan de
pîrekek nêrîna wê xweşik bibînî û
dilê te wê bikişîne[1] û tu bixwaze ku
wê bi jinitî ji xwe re bistîne; 12 wê
gavê tuyê wê bîne hundirê mala
xwe û dê ew serê xwe kur bike û
neynûkên xwe jêbike; 13 dê kincê
dîlitiyê ji ser xwe bavêje û dê ew ê
li mala te rûnê û bêkêmasî mehekê
ji dayik û bavê xwe re bigirî û paşî
vêya tuyê nêzîkî wê bibe û tuyê
bibe mêrê wê û dê ew bibe jina te.
14 Û dê wusa bibe ku, ger tu jê hez
neke, wê gavê canê wê çawa bi-
xwaze tuyê wê berde; lê belê tuyê
tu carî wê bi pere nefiroşe, tuyê
mîna koleyekê tev gerînê lê neke,
ji ber ku te wê nizm kir.

*Lawê ku pêşiyê bûye*

15 Ger yek ya jê tê hezkirin û ya
din jî jê tê kerihandin, du pîrekên
zilamekî hebin û pîrekên tên hezki-
rin û kerihandin lawan jê re anîbin
dinê û lawê ku pêşiyê bûye, ger ji
pîreka ku jê ve têtê kerihandin be;
16 wê gavê dê wusa bibe ku, di
roja ku malê pê re ye bi mêrasî ji
lawên xwe re par bike, li ser lawê
ku ji pîreka jê dikerihin, nikare
mafê lawê yekemîniyê bide lawê
xwe yî ji pîreka ku jê ve têtê hez-
kirin bûye; 17 lê belê bi dayîna du
para hemû malên ku pê re ne bide
lawê xwe yî ji pîreka ku jê re têtê
kerihandin bûye, dê bi lawê pêşiyê
bûyînê wî nas bike; ji ber ku ew
destpêka quweta wî ye; mafê yê
ku pêşiyê bûyiye yê wî ye.

*Lawê ku gotinê guhdarî nake*

2.Mûs 20,12

18 Ger lawekî zilamekî yê bi in-
yad û asê, gotina bavê xwe û go-
tina dayika xwe guhdarî nake û
çawa ku wî perwerde dikin, lê dîsa
jî wan guhdarî nake hebe; 19 wê
gavê dayik û bavê wî dê bi wî bi-
girin û derxînin cem kalepîrên ba-
jarê wî û deriyê cîhê wî 20 û dê
ji kalepîrê bajarê wî re bibêjin: Ev
lawê me bi inyad û asê ye, gotina
me guhdarî nake, çilek û araqxur
e! 21 Û dê hemû zilamên bajarê
wî, wî bi kevir ve birecimînin û
dê bimire; tuyê ji nav we xerabiyê

1 Bixwaze.

rake û dê hemûya Îsraêlê bibihîzin
û bitirsin.

*Yê ku hatiye daliqandin, binalet e*
Yêşû 8,29

22 Û ger zilamek sûcekî musteha-
qî mirinê kiribe û bête kuştin û ger
tu wî li ser darekî daliqîne; 23 dê
meytê wî di tûmiya şevê de li ser
darê nemîne, lê belê tuyê di wê
rojê de muheqeq wî binax bike; ji
ber, zilamê ku hatiye daliqandin,
ji aliyê Xwedê ve binalet e û tuyê
welatê ku Xwedayê te XUDAN
bi mêrasî dide te mindar neke.

22 Dema te ganêr an jî mîha
birayê xwe ji rê ve çewt
bûyî dît, tuyê wan ji nedîtinê neyê;
muheqeq tuyê wan ji birayê xwe
re şunda bîne. 2 Û ger birayê te
ne nêzîkî te be, an jî ger tu wî nas
neke, wê gavê tuyê wê bîne mala
xwe û heta ku birayê te lê bige-
re, dê li cem te bimîne û tuyê wê
şunda bide wî. 3 Û tuyê bona kerê
wî wusa bike û bona kincê wî wusa
bike û bona her tiştên wî yên win-
dayî, yên ku birayê te winda kiriye
û te jî dîtiye tuyê wusa bike; divê tu
ji nedîtinê neyê. 4 Dema te ker an jî
ganêrê birayê xwe di rê de ketî dît,
divê tu wan ji nedîtinê neyê; mu-
heqeq tuyê tevî wî wan rake.
5 Dê kincê zilam li ser pîrekê
nebe û zilam kincê pîrekê li xwe
neke; ji ber her kesê ku van tiştan
çêdikin, mekrûhê Xwedayê te
XUDAN in.
6 Ger di rê de, bi rasthatinî li ber
te li ser her yekî darekî, an jî li ser
erdê tevî çêlikan, an jî hêkan hêlî-
nek civîkan hebe û ger dayik li
ser hêkan an jî çêlikan rûniştî be,
tuyê dayikê tevî çêlikan ranehêle;
7 bona ku ji te re bibe qencî û te-
mena te dirêj bibe, tuyê muheqeq
dayikê berde, lê belê tu dikarî
bona xwe çêlikan rahêle.
8 Dema tu xaniyekî nû ava bike,
tuyê bona xaniyê xwe batirsokê çê-
bike, da ku, ger yek ji wir bikeve,
tu xwînê neyne ser xaniyê xwe.
9 Tuyê rezê xwe bi du celebê tovê
ve neçîne, ya na tijîbûna wê, tova
ku te çandiye û berê rez bona cîhê
pîroz dê bê stendin. 10 Tuyê ker
tevî ganêr nebezîne cot ajotinê.
11 Tuyê qumaşê rîs û kitan tevî
hev li xwe neke.
12 Tuyê li ser çar qozîkên rûbera
ku tu xwe pê duxumîne pasaran
çêbike.

*Qaîdeyên di derbarê pakbûna cinsî de*
4.Mûs 5,11-31

13 Ger zilamek pîrekekê bigi-
re û nêzîkî wê bibe û jê bikerihe
14 û lêbarkirina tiştên şerm lê bike
û navê wê xera bike û ger: Vê pîre-
ka stendim û dema nêzîkî wê bûm,
tê de nîşaniyên qîzitiyê nedîtim, bi-
bêje; 15 wê gavê dayik û bavê pîre-
ka ciwan dê nîşanên qizîtiyê yên

bibêjin: Destên me vê xwînê nerijandin û çavên me wî nedîtin. 8 Ji netewa xwe yî te xelas kiriye, ji Îsraêlê re biborîne, ya XUDAN û di nav netewa xwe Îsraêlê de xwîna bêsûc nehêle. Bi vî awayî dê gunehê xwîn rijandinê li wan bête bexşandin. 9 Û dema tu ya ku di çavê XUDAN de rast e bikî, tuyê xwîna bêsûc ji nav xwe rake.

*Bi Pîrekek girtî re zewac*

5.Mûs 20,10-14

10 Dema tu li dijî neyarên xwe derkeve cengê û Xwedayê te XUDAN wan bide destê te û tu wan bi dîlitî bibe, 11 ger tu di nav dîlan de pîrekek nêrîna wê xweşik bibînî û dilê te wê bikişîne[1] û tu bixwaze ku wê bi jinitî ji xwe re bistîne; 12 wê gavê tuyê wê bîne hundirê mala xwe û dê ew serê xwe kur bike û neynûkên xwe jêbike; 13 dê kincê dîlitiyê ji ser xwe bavêje û dê ew ê li mala te rûnê û bêkêmasî mehekê ji dayik û bavê xwe re bigirî û paşî vêya tuyê nêzîkî wê bibe û tuyê bibe mêrê wê û dê ew bibe jina te. 14 Û dê wusa bibe ku, ger tu jê hez neke, wê gavê canê wê çawa bixwaze tuyê wê berde; lê belê tuyê tu carî wê bi pere nefiroşe, tuyê mîna koleyekê tev gerînê lê neke, ji ber ku te wê nizm kir.

*Lawê ku pêşiyê bûye*

15 Ger yek ya jê tê hezkirin û ya din jî jê tê kerihandin, du pîrekên zilamekî hebin û pîrekên tên hezkirin û kerihandin lawan jê re anîbin dinê û lawê ku pêşiyê bûye, ger ji pîreka ku jê ve tête kerihandin be; 16 wê gavê dê wusa bibe ku, di roja ku malê pê re ye bi mêrasî ji lawên xwe re par bike, li ser lawê ku ji pîreka jê dikerihin, nikare mafê lawê yekemîniyê bide lawê xwe yî ji pîreka ku jê ve tête hezkirin bûye; 17 lê belê bi dayîna du para hemû malên ku pê re ne bide lawê xwe yî ji pîreka ku jê re tête kerihandin bûye, dê bi lawê pêşiyê bûyînê wî nas bike; ji ber ku ew destpêka quweta wî ye; mafê yê ku pêşiyê bûyiye yê wî ye.

*Lawê ku gotinê guhdarî nake*

2.Mûs 20,12

18 Ger lawekî zilamekî yê bi inyad û asê, gotina bavê xwe û gotina dayika xwe guhdarî nake û çawa ku wî perwerde dikin, lê dîsa jî wan guhdarî nake hebe; 19 wê gavê dayik û bavê wî dê bi wî bigirin û derxînin cem kalepîrên bajarê wî û deriyê cîhê wî 20 û dê ji kalepîrê bajarê wî re bibêjin: Ev lawê me bi inyad û asê ye, gotina me guhdarî nake, çilek û araqxur e! 21 Û dê hemû zilamên bajarê wî, wî bi kevir ve birecimînin û dê bimire; tuyê ji nav we xerabiyê

---

1 Bixwaze.

rake û dê hemûya Îsraêlê bibihîzin
û bitirsin.

*Yê ku hatiye daliqandin, binalet e*
Yêşû 8,29

22 Û ger zilamek sûcekî musteha-
qî mirinê kiribe û bête kuştin û ger
tu wî li ser darekî daliqîne; 23 dê
meytê wî di tûmiya şevê de li ser
darê nemîne, lê belê tuyê di wê
rojê de muheqeq wî binax bike; ji
ber, zilamê ku hatiye daliqandin,
ji aliyê Xwedê ve binalet e û tuyê
welatê ku Xwedayê te XUDAN
bi mêrasî dide te mindar neke.

22 Dema te ganêr an jî mîha
birayê xwe ji rê ve çewt
bûyî dît, tuyê wan ji nedîtinê neyê;
muheqeq tuyê wan ji birayê xwe
re şunda bîne. 2 Û ger birayê te
ne nêzîkî te be, an jî ger tu wî nas
neke, wê gavê tuyê wê bîne mala
xwe û heta ku birayê te lê bige-
re, dê li cem te bimîne û tuyê wê
şunda bide wî. 3 Û tuyê bona kerê
wî wusa bike û bona kincê wî wusa
bike û bona her tiştên wî yên win-
dayî, yên ku birayê te winda kiriye
û te jî dîtiye tuyê wusa bike; divê tu
ji nedîtinê neyê. 4 Dema te ker an jî
ganêrê birayê xwe di rê de ketî dît,
divê tu wan ji nedîtinê neyê; mu-
heqeq tuyê tevî wî wan rake.
5 Dê kincê zilam li ser pîrekê
nebe û zilam kincê pîrekê li xwe
neke; ji ber her kesê ku van tiştan
çêdikin, mekrûhê Xwedayê te
XUDAN in.
6 Ger di rê de, bi rasthatinî li ber
te li ser her yekî darekî, an jî li ser
erdê tevî çêlikan, an jî hêkan hêlî-
nek civîkan hebe û ger dayik li
ser hêkan an jî çêlikan rûniştî be,
tuyê dayikê tevî çêlikan ranehêle;
7 bona ku ji te re bibe qencî û te-
mena te dirêj bibe, tuyê muheqeq
dayikê berde, lê belê tu dikarî
bona xwe çêlikan rahêle.
8 Dema tu xaniyekî nû ava bike,
tuyê bona xaniyê xwe batirsokê çê-
bike, da ku, ger yek ji wir bikeve,
tu xwînê neyne ser xaniyê xwe.
9 Tuyê rezê xwe bi du celebê tovê
ve neçîne, ya na tijîbûna wê, tova
ku te çandiye û berê rez bona cîhê
pîroz dê bê stendin. 10 Tuyê ker
tevî ganêr nebezîne cot ajotinê.
11 Tuyê qumaşê rîs û kitan tevî
hev li xwe neke.
12 Tuyê li ser çar qozîkên rûbera
ku tu xwe pê duxumîne pasaran
çêbike.

*Qaîdeyên di derbarê pakbûna cinsî de*
4.Mûs 5,11-31

13 Ger zilamek pîrekekê bigi-
re û nêzîkî wê bibe û jê bikerihe
14 û lêbarkirina tiştên şerm lê bike
û navê wê xera bike û ger: Vê pîre-
ka stendim û dema nêzîkî wê bûm,
tê de nîşaniyên qîzitiyê nedîtim, bi-
bêje; 15 wê gavê dayik û bavê pîre-
ka ciwan dê nîşanên qizîtiyê yên

pîreka ciwan rahêlin û bînin derî,
ji kalepîrên bajarê re 16 û dê bavê
pîreka ciwan ji kalepîran re bibêje:
Min qîza xwe bi jinitî da vî zilamî
û jê dikerihe 17 û a vay, bi gotina:
Min di qîza te de nîşanên qîzitiyê
nedît tiştên şerm lê bar kirin; lê belê
nîşanên qîzitiyê yên qîza min vana
ne. Û dê kinc li ber kalepîrên bajêr
ve raxînin. 18 Û dê kalepîrên ba-
jêr wî zilamî rahêlin û hişdar bikin
19 û dê wî mehkûmî cezaya sed
şekel[1] perê zîv bikin û bidin bavê
pîreka ciwan, ji ber ku wî zilamî
navê qîzekî Îsraêlê xera kir û dê
pîrek bibe jina wî zilamî; di tûmi-
ya temena xwe de dê nikaribe wê
berde. 20 Lê belê ger ev tişt, bi
pîreka ciwan re tunebûna nîşanên
qîzitiyê rast be; 21 wê gavê dê
pîreka ciwan derxînin deriyê mala
bavê wê û dê zilamên bajarên wê,
bi kevir ve birecimînin û dê bimire,
ji ber ku di mala bavê xwe de bi ki-
rina zinayê, li Îsraêlê rezîltî kiriye û
tuyê ji nav xwe xerabiyê rake.
22 Ger zilamek, bi pîreka zilamekî
din re raketî bête dîtin, wê gavê
zilamê ku bi pîrekê re radikeve û
pîrek, dê ew her du jî bên kuştin û
tuyê xerabiyê ji Îsraêlê ve rake.
23 Ger pîrekek ciwan ya ku qîz
e, bi zilamekî re dergistî be û zi-
lamek wê di bajêr de bibîne û pê
re rakeve; 24 wê gavê hûn ê wan
her duyan jî derxînin deriyê bajêr
û wan, çawa ku li bajêr de bû, lê
ne qêriyaye pîrekê û ji ber ku jina
cîranê xwe nizm kiriye, zilam bi
kevir ve birecimînin û dê bimirin
û tuyê xerabiyê ji nav xwe rake.
25 Lê belê ger zilam, pîreka der-
gistî li beyarê bibîne û wê bigire û
pê re rakeve; wê gavê tenê zilamê
ku pê re raketiye, dê bête kuştin;
26 lê belê tuyê tiştekî bi pîreka
ciwan re neke; di pîreka ciwan
de sûcê ku musteheqê mirinê ye
nîne; ji ber çawa ku zilamek li
dijî cîranê xwe rabe û wî bukuje,
ev tişt jî wusa ye; 27 ji ber ku wê
di beyarê de dît, pîreka ciwan ya
dergistî qêriyaye, lê belê kesî ku
wê xelas bike nebûye[2].
28 Ger zilamek pîrekek ciwan ya ku
qîz e û dergîstî nebûye bibîne û pê
bigire û pê re rakeve û ew bên dîtin;
29 wê gavê zilamê ku pê re raketiye,
dê pêncî şekel zîvî bide bavê pîreka
ciwan û dê pîrek bibe jina wî; ji ber
ku wê nizm kiriye; dê di tûmiya te-
mena xwe de wê bernede.
30 Dê zilamek jina bavê xwe ne-
gire û dawa bavê xwe veneke.

*Yên ku li derveyî Civakê hatine hiştin*

23 Zilamekî hêlika wî eciqi-
ye[3], an jî lebatê mêraniya

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Derneketiye.
3 Helisiye.

wî hatiye jêkirin, dê nekeve civa-
ka XUDAN.
2 Dê lawikê fahîşê[1] nekeve civaka
XUDAN; tu yên ji wî ne, heta qasî
ku bighîje nifşeya wî yî dehemîn,
dê nekeve civaka XUDAN.
3 Ammoniyek an jî Moabiyek
dê nekeve civaka XUDAN; tu
kes ji wan, heta qasî nifşeya de-
hemîn, dê tu carî nekeve civaka
XUDAN; 4 ji ber, dema ku hûn
ji Misirê derketin, bi nan û avê
derneketin pêşiya we û ji ber ku
li dijî te, li bajarê Petorê ya Aram-
Naharayîmê[2] Balamê lawê Beor,
bona ku naletê ji te re bike, bi
mişe girtin. 5 Lê belê Xwedayê
te XUDAN nexwest ku Balam
guhdarî bike; lê belê Xwedayê
te XUDAN naletê bona te verge-
rand bereketê, ji ber ku Xwedayê
te XUDAN ji te hez kir. 6 Tuyê
di tûmiya temena xwe de, qet li
xweşî û qenciya wan negere.
7 Tuyê ji Edomî nekerihe; ji ber
ku ew birayê te ye; tuyê ji yê Mi-
sirî nekerihe, ji ber ku tu li welatê
wî xerîb bû. 8 Zarokên nifşeya
sêwemîn yên ku ji wan re bûyîne,
dê bikevin civaka XUDAN.

*Paqij girtina Artêşgehê*

4.Mûs 5,1-4

9 Dema tu ji artêşgehê li dijî
neyarên xwe derkeve, tuyê xwe
ji her yek tiştên xerab biparêze.
10 Ger di nav we de zilamekî
ku ji ber rewşa şevê ne paqij e
hebe, wê gavê dê derkeve der-
veyî artêşgehê, dê nekeve hundirê
artêşgehê; 11 lê belê dê wusa bibe
ku, dema bibe êvar dê di avê de
xwe bişo û dema roj biçe ava dê
bikeve artêşgehê. 12 Û dê li der-
veyî artêşgehê cîhekî te hebe û
di wir de derkeve derve 13 û dê
di nav çekên te de sîngek hebe û
dê wusa bibe ku, dema tu li derve
rûnê, tuyê bi wê bikole û bizivire
û yên ku ji te derketine bi wê ve
bunuxumînin; 14 ji ber ku Xwe-
dayê te XUDAN bona ku te xe-
las bike û di ber te de neyarên te
bide dest, di navbera artêşgeha te
de dimeşe; bo vê yekê, ji bo di te
de tiştekî kirêt nebîne û ji te wecê
xwe nezivirîne dê artêşgeha te
pîroz be.

*Cûreyên Qaîdeyan*

3.Mûs 19,29; 18,24-30

15 Tuyê dîlê ku ji cem efendiyê
xwe reviyaye cem te, nede efen-
diyê wî; 16 dê bi te re di nav we
de, ji bajarê te di bajarekî de, li
cîhê ku ecibandiye û bijartiye dê
rûnê; tuyê tengasiyê nede wî.
17 Dê ji qîzên Îsraêlê û ji lawên
Îsraêl, kesî ku xwe weqfî fuhşê
kiriye tune be. 18 Tuyê qezenca

[1] Zinê.

[2] Mezopotamya.

fuhşa pîrekê, an jî mişeya fuhşa
zilam bona her yek qewlekê nîne
Perestgeha Xwedayê xwe XU-
DAN; ji ber ku vana her duyan jî
tiştên ku ji Xwedayê te XUDAN
re mekrûh in.
19 Dixwaze bila selefa pere be,
selefa zexîrê be, an jî selefa her
tiştên ku bi deyn ve tên dayîn bin,
tuyê bi selefê deyn nede birayê
xwe. 20 Tu dikarî bi selefê deyn
bide yê biyan, lê belê tuyê bi se-
lefê deyn nede birayê xwe, da ku,
li welatê tu bona bi milkî bistîne
diçê, di her tiştên ku tuyê destê
xwe bavêjê de bila Xwedayê te
XUDAN te pîroz bike. 21 Dema
tu ji Xwedayê xwe XUDAN re
qewlê bide, tuyê di dayîna wê de
dereng nemîne; ji ber ku Xwedayê
te XUDAN dê muheqeq wê di te
de bigere û dê bona te bibe sûc.
22 Lê belê ger tu ji qewl dayinê
xwe vekişîne[1], dê bona te nebe
sûc. 23 Te pêşkêşiya ji dil ya ku bi
devê xwe ve gotiye çawa ji Xwe-
dayê xwe XUDAN re qewil kiribe,
tuyê bi vî awayî ya ku ji devê te
derketiye bigire û bike. 24 Dema
tu bikeve rezê cîranê xwe, wekî ku
canê te bixwaze, heta ku tu têr bibe
tuyê bikaribe tirî bixwe, lê belê
tuyê nexe feraxa xwe.
25 Dema tu bikeve nav zadê cîranê
xwe, tu dikarî bi destê xwe ve si-
milan jêbike; lê belê tuyê dasê li
zadê cîranê xwe ve kil neke!

*Di derbarê jinberdanê de*
Met 5,31-32; 19,3-9

24 Dema zilamek pîrekekê
rahêle û pê re bizewice,
dê wusa bibe, ji ber ku di wê de
tiştekî şermezariyê dîtiye, ger
pîrek di çavê wî de saye nebîne,
dê kaxeza wê yî berdanê binivîse
û bide destê wê û dê wê ji mala
xwe ve bişîne. 2 Û paşî ku ji mala
wî cuda bû, pîrek dikare here û
bibe jina zilamekî din. 3 Û ger
zilamekî din jî jê bikerihe û bona
wê kaxeza berdanê binivîse û bide
destê wê û wê ji mala xwe bişîne;
an jî ger zilamê ku wê bi jinitî ji
xwe re stendiye bimire; 4 zilamê
wê yî berê ê ku wê şandiye, paşî
ku jinik hate mindar kirin, nikare
wê dîsa bi jinitî ji xwe re bigire;
ji ber ku li ber XUDAN ev tiştekî
mekrûh e û li welatê ku Xwedayê
te XUDAN bi mêrasî dide te, tuyê
sûcê nede kirin.
5 Dema zilamek jinekî nû bîne,
dê dernekeve cengê û dê tu karî li
ser wî ve nekin; dê salekê di mala
xwe de serbest bibe û pîreka ku pê
re zewiciye, dê kêfxweş bike.
6 Dê tu kes aşê an jî kevirê wê yî
jorîn bi mişkaneyî negire; ji ber
ku jiyana zilam mişkane digire.
7 Ger ji lawên Îsraêl, zilamekî ku
ji birayê xwe ve canekê didize

---

1 Xwe ji qewl dayînê biparêze.

hebe û mîna dîlan lê bike, an jî wî
bifroşe, wê gavê dê ew diz bimire
û tuyê xerabiyê ji nav we rake.
8 Di nexweşiya cizamê de bala
xwe bidin ku hûn li gor her tiştên
ku kahînan, Lêwiyiyan hînî we
dikin, bikin û wan bi balkêşî bi-
girin; hûn ê ji bo wekî ku emir
dayîme wan bikin, pê bigirin.
9 Dema hûn ji Misirê derketin,
tiştê ku Xwedayê te XUDAN di
rê de ji Mîryamê re kir, di bîra
xwe de bînin.
10 Dema tu tiştekî bi deyn bide
cîranê xwe, ji bo ku tu mişkaneya
wî bistîne tuyê nekeve mala wî.
11 Tuyê li derve bisekine û zi-
lamê ku te bi deyn daye wî, dê
mişkaneyê ji te re derxîne derve.
12 Û ger ew zilam zebûn be, tuyê
bi mişkaneya wî re ranekeve;
13 dema roj biçe ava tuyê mu-
heqeq mişkaneyê şunda bide wî û
dê di kincê xwe de rakeve û duaya
xêrê ji te re bike û dê li ber Xwe-
dayê te XUDAN bona te çêbûn
bête hesibandin.
14 Dixwaze bila ji birayên te bin,
an jî ji xerîbên te yên ku di nav
bajarên te de ne bibin, tuyê ten-
gasiyê nede kesê zebûn û xizanê
bi heqdest[1]; 15 tuyê mişeya wî di
roja wî de berî ku roj bihilê bide,
ji ber ku zebûn e û dilê wî bêriya
wê dike; ya na dê li dijî te ji XU-
DAN re feryadê bike û dê bona te
bibe sûc.
16 Dê bona lawan bav neyên
kuştin û bona bavikan law neyên
kuştin; dê her kes bona sûcê xwe
bên kuştin.
17 Tuyê di derheqê xerîb û sêwî
de daraziyê neguhere û kincê jine-
biyê bi mişkaneyî nestîne 18 û
tuyê dîlitiya li Misirê û xelas ki-
rina xwe ya ku Xwedayê te XU-
DAN te ji wir xelas kiriye jî di
bîra xwe de bîne; kirina vî tiştî ez
bona vê yekê ji te re emir dikim.

*Mafê yên xerîb, sêwî û jinebiyê*

19 Dema te di zeviyê de zadê xwe
çinand û demetekê li zeviyê ji bîr
kir, tuyê bona ku wê bistîne vene-
gere; bona ku di her karê destê te
de Xwedayê te XUDAN te pîroz
bike, dê ew bibe yên xerîb, sêwî
û jinebiyê. 20 Dema te darên xwe
dawişandin û zeytûnên xwe dan
hev, bona ku yê li pêy mayî bidî
hev, tuyê venegere; dê bibe yên
xerîb, sêwî û jinebiyê. 21 Dema
tu rezê xwe xera bike, bona ku
yê li pêy mayî bidî hev, tuyê ve-
negere; dê bibe yên xerîb, sêwî û
jinebiyê. 22 Tuyê li welatê Misirê
dîlbûna xwe di bîra xwe de bîne;
ez kirina vî tiştî bona vê yekê ji te
re emir dikim.

25 Ger di nav zilaman de
keftûleftek çêbibe û werin

[1] Yê ku bi mîşeyê dixebite.

dadgehê û serweran di derheqê
wan de daraziyê bidin; wê gavê
dê yê salih bêsûc û yê xerab bisûc
derxînin. 2 Û dê wusa bibe ku,
zilamê xerab ger mustehaqî lêxis-
tinê be, dê serwer wî bide dirêj
kirin û li ber xwe, li gor xerabiya
wî, bi hejmarê wî bide lêxistin.
3 Dikare çel çoyî lê bide lêxistin,
dê zêde neke; ya na ger zêde bike
û ji vêya zêdetir lêbixe, wê gavê dê
birayê te di çavê te de nizm bibe.
4 Tuyê devê gayê ku bênderê cer-
cere dike, girê nede.
5 Ger bira pev re rûnin û yek ji
wan bimire û lawê wî tune be, dê
pîreka yê miriye, ji derve bi zila-
mekî biyan re nezewice; dê birayê
mêrê wê nêzîkî wê bibe û bona ku
jê re bibe jin, wê bigire û wezîfa
tîbûnê dê jê re bike. 6 Û dê wusa
bibe ku, lawê pêşiyê yê ku pîrekê
wî aniye dinê, bi navê birayê ku
miriye, dê cîhê wî bigire û dê navê
wî ji Îsraêlê ve neyê rakirin. 7 Û
ger ew zilam nexwaze ku bi jina
birayê xwe re bizewice, wê gavê
dê jina birayê wî derkeve derî,
cem kalepîran û dê bibêje: Tiyê
min li Îsraêlê ji sekinandina navê
birayê xwe, xwe dide alî; naxwa-
ze wezîfeya tiyitiyê li min bike.
8 Wê gavê dê kalepîrên bajarê wî
bangî wî bikin û jê re bibêjin û ger
bisekine û: Ez naxwazim wê bistî-
nim bibêje; 9 wê gavê dê li cem
kalepîran pîreka birayê wî were
cem wî û dê çarixa wî ji lingê wî
derxîne û tûyî ser çavê wî bike û
dê bersivê bide û bibêje: Ji zilamê
ku mala birayê xwe ava nake re,
wusa tê kirin. 10 Û li Îsraêlê dê
navê wî wekî: Yê çaroxa wî hati-
ye derxistin, bête bang kirin.
11 Dema ku zilaman bi hev re şer
bikin, pîreka yekî nêzîk bibe û
bona zilamê xwe xelas bike destê
xwe dirêjî destê yê ku li zilamê
wê dixe bike û ger bi cîhê wî yê
şermezariyê bigire; 12 wê gavê
tuyê destê pîrekê jêbike, dê heyfa
çavê te lê neyê.
13 Dê di kîsê te de mezin û biçûk,
bi du celebî wezin[1] tune be.
14 Divê li mala te mezin û biçûk,
du pîvek[2] tune be. 15 Bona ku li
welatê Xwedayê te XUDAN dide
te temena te dirêj bibe, divê wezna
te tam û rast be; dê pîveka te tam û
rast be. 16 Ji ber yên ku hemûyên
van tiştan dikin, hemûyên ku
neheqiyê dikin ji Xwedayê te
XUDAN re mekrûh in.

*Daraziya li dijî Amalek*

2.Mûs 17,8-16

17 Dema hûn ji Misirê derketin
tiştên ku Amalek di rê de ji te re
kirine, 18 ka çawa li rê derket pêr-
gîniya te û dema tu westayî bû,

1 Şehîn, terazî.

2 Bi Îbranîtî: Efa ye. Nêzîkî 22 lître ye.

lêxistina wî yî ên te yên ku li pêy
mayîne, hemû lawazên li pêy te ne
di bîra xwe de bîne û ew ji Xwedê
netirsiya. 19 Û dê wusa bibe ku,
li welatê ku Xwedayê te XUDAN
bona ku tu ji xwe re bike milk bi
mêrasî dide te, dema Xwedayê te
XUDAN bi dor û ber ji neyarên te
ve aramiyê daye te, tuyê ji bin ez-
manan ve bîranîna Amalek paqij
bike[1]. Tuyê ji bîr neke!

*Dexlê Pêşîn û dehek*
2.Mûs 23,19

26 Û dê wusa bibe ku, dema tu
bikeve welatê ku Xwedayê
te XUDAN bi mêrasî dide te û
dema tu wê ji xwe re bike milk û tê
de rûnê, 2 tuyê ji nûberê hemûya
zadê axa ku tu ji cîhê Xwedayê te
XUDAN daye te dide hev bigire û
tuyê wê têxe selikekê û tuyê here
cîhê ku Xwedayê te XUDAN bona
ji navê wî re bibe şunwar bijartiye.
3 Û tuyê here cem yê ku di wan
rojan de kahîn e û tuyê jê re bibêje:
Ez îroj ji Xwedayê te XUDAN re
dighînim ku, ez hatim welatê ku
XUDAN bona bide me, ji bapîrên
me re sondê dayîbû. 4 Û dê kahîn
ji destê te selikê rahêle û dê wê li
ber pêşkêşîgeha Xwedayê te XU-
DAN deyne erdê. 5 Û tuyê li ber
Xwedayê xwe XUDAN bersivê
bide û wusa bibêje: Bavê min Ara-
miyek koçer bû û bi hejmarî hindi-
kî daket Misirê û li wir bû mêvan
û li wir bû neteweyek xwurt û bi
hejmarî zêde. 6 Û Misiriyan ji me
re bi xerabiyê kirin û me nizm ki-
rin û xizmeta giran danîn ser me
7 û me ji Xwedayê bapîrên xwe
XUDAN re feryadê kirin û XU-
DAN dengê me bihîst û zebûniya
me û zehmeta me û tengasiya me
dît 8 û XUDAN bi destê xwurt û
bi milê dirêjbûyî û bi toqînek me-
zin û bi elamet û nuwazeyan me ji
Misirê derxist 9 û me anî vê derê,
vî welatî, welatê ku jê şîr û hungiv
diherike da me. 10 Û niha, ya XU-
DAN, nûberê zadê axa ku te daye
min a vay, anîm. Û tuyê wê dey-
ne cem Xwedayê xwe XUDAN
û li ber Xwedayê xwe XUDAN
tuyê secde bike 11 û tu û Lêwiyî
û xerîbê ku di nav we de ye, hûn
ê di hemû qenciya ku Xwedayê te
XUDAN daye te û maliyên te de
kêfxweş bibin.
12 Di sala sêwemîn de, di sala
cihê kirina dehekiyê de, dema te
cihê kirina dehekiya zadê xwe qe-
dand, tuyê wê bide Lêwiyî, xerîb,
sêwî û jinebiyê û dê di deriyên te
de bixwin û têr bibin. 13 Û tuyê
li ber Xwedayê xwe XUDAN bi-
bêje: Li gor hemû emirên ku te ji
min re emir kiribû, tiştên pîroz ji
mala xwe derxistim û him jî wan
dam Lêwiyî û xerîb û sêwî û jine-
biyê; ji emirên te derneketim û ji

[1] Rabike, tune bike.

bîr nekirim; 14 dema di şîna xwe
de bûm ji wê nexwarim û dema
mindar bûm jê ranehiştim û bona
mirî jê nedam; gotina Xwedayê
xwe XUDAN guhdarî kirim, li
gor her tiştê ku te ji min re emir
kirine kirim. 15 Ji şunwara xwe yî
pîroz, ji ezmanan ve li jêr binêre û
netewa xwe Îsraêlê û welatê mîna
ku te ji bapîrên me re wad kiribû
daye me, welatê ku jê şîr û hungiv
diherike pîroz bike!

*Gelê Xwedê*

16 Îroj Xwedayê te XUDAN
kirina van zagonan û daraziyan
ji te re emir dike û tuyê wan bi
hemûya dilê xwe û bi hemûya canê
xwe bigire û bike. 17 Te îro tesdîq
kir ku XUDAN Xwedayê te ye û
tuyê di rêyên wî de bimeşe û tuyê
bi zagon û emir û daraziyên wî ve
bigire û tuyê gotina wî guhdarî
bike 18 û XUDAN jî, mîna ku ji
te re gotibû, îro tesdîq kir ku tu
netewa wî yî xas e, bo vê yekê
tuyê bi hemû emirên wî ve bigire;
19 wê çaxê, mîna ku gotibû, bona
tu ji Xwedayê xwe XUDAN re
bibe neteweyek pîroz, dê te ji
hemû neteweyên ku afirandine di
pesn vedanê de û di nav û deng de
û di mezintiyê de seretetir bike.

*Pêşkêşgeha li Çiyayê Ebalê*

27 Û Mûsa û kalepîrên Îsraêlê
emir dan netewê û gotin:
Bi hemûya emrê ku îroj ji we re
emir dikim bigirin! 2 Û dê wusa
bibe, roja ku hûn ê ji Urdunê ve
derbasî welatê ku Xwedayê te
XUDAN dide te bibin, tuyê bona
xwe kevirên mezin biçikîne û
tuyê wan bi kilsê ve bi kils bike
3 û dema ku tu derbas bibe tuyê
hemû gotinên vê zagonê li ser
wan binivîsîne; da ku, tu bikari-
be bikeve welatê jê şîr û hungiv
diherikin, yê ku dê Xwedayê te
XUDAN bide te, welatê ku mîna
Xwedayê bapîrên te XUDAN
ji te re wad kiriye. 4 Û dê wusa
bibe ku, dema hûn ji Urdunê ve
derbas bibin, van kevirên ku îroj
emirên wan li we dikim, hûn ê
li çiyayê Ebalê biçikînin û tuyê
wan bi kilsê ve bi kils bike. 5 Û
tuyê li wir ji Xwedayê xwe XU-
DAN re pêşkêşîgeh, ji keviran
pêşkêşîgehekê ava bike; tuyê li ser
wan haletê hesin nede şuxulandin.
6 Tuyê pêşkêşîgeha Xwedayê
xwe XUDAN ji kevirên ku neha-
tine qewartin çêbike û tuyê li ser
wê ji Xwedayê xwe XUDAN re
pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş
bike 7 û tuyê pêşkêşiyên xweşiyê
pêşkêş bike û li wir bixwe û tuyê
li ber Xwedayê xwe XUDAN ve
kêfxweş bibe. 8 Û tuyê li ser kevi-
ran hemû gotinên vê zagonê zehf
paknivîs binivîsîne!
9 Û Mûsa û kahînan, Lêwiyiyan,
bi hemûya Îsraêlê re axifîn û go-

tin: Hiş be û guhdarî bike, ya Îs-
raêl! Tu îroj bû netewa Xwedayê
xwe XUDAN. 10 Û tuyê gotina
Xwedayê xwe XUDAN guhdarî
bike û emir û zagonên wî yên ku
îroj ji te re emir dikim, bike!

*Nalet û Bereketên li Çiyayê Gerîzîm û Ebalê*

5.Mûs 11,26-30; Yêşû 8,30-35

11Û Mûsa wê rojê emir da ne-
tewê û got: 12 Dema hûn ji Ur-
dunê ve derbas bibin, bona ne-
tewê pîroz bikin yên ku dê li ser
çiyayê Gerîzîmê bisekinin vana
ne: Şîmeûn û Lêwî û Cihûda û
Îsşakar û Ûsiv û Benyamîn. 13 Û
yên ku bona naletê bikin li ser çi-
yayê Ebalê bisekinin vana ne: Rû-
ben, Gad û Aşer û Zebûlûn, Dan
û Naftalî. 14 Û dê Lêwiyî bi den-
gekî bilind bersivê bidin hemû zi-
lamên Îsraêlê û bibêjin:
15 Karê destê hunermendekî, zi-
lamê ku pûtê qewartî an jî rijandî,
ê ku ji XUDAN re mekrûh e çêbi-
ke, an jî bi dizîka biçikîne, bila bi
nalet be! Û dê hemû netewe bersi-
vê bidin û: Amîn! bibêjin.
16 Yê ku bavê xwe an jî dayika
xwe biçûk bibîne, bila bi nalet be!
Û dê hemû netewe: Amîn! bibêjin.
17 Yê ku cîhê sînorê cîranê xwe
buguhere, bila bi nalet be! Û dê
hemû netewe: Amîn! bibêjin.
18 Kî ku yê kor ji rê derxîne, bila
bi nalet be! Û dê hemû netewe:
Amîn! bibêjin.
19 Yê ku mafê xerîb, sêwî û jine-
biyê xwar bike, bila bi nalet be! Û
dê hemû netewe: Amîn! bibêjin.
20 Yê ku bi jina bavê xwe re rake-
ve, bila bi nalet be, ji ber ku dawa
bavê xwe vekiriye! Û dê hemû
netewe: Amîn! bibêjin.
21 Yê ku bi her yek heywanî re
rakeve[1], bila bi nalet be! Û dê
hemû netewe: Amîn! bibêjin.
22 Yê ku bi xwuşka xwe yî qîza
bavê xwe an jî qîza dayika xwe yî
re rakeve, bila bi nalet be! Û dê
hemû netewe: Amîn! bibêjin.
23 Yê ku bi xwesiya xwe re ra-
keve, bila bi nalet be! Û dê hemû
netewe: Amîn! bibêjin.
24 Yê ku bi dizîka li cîranê xwe
bixe, bila bi nalet be! Û dê hemû
netewe: Amîn! bibêjin.
25 Yê ku bona kuştina zilamê bêsûc
bertîlê bistîne, bila bi nalet be! Û dê
hemû netewe: Amîn! bibêjin.
26 Yê ku bona kirina[2] gotinên
vê zagonê wan tesdîq neke, bila
bi nalet be! Û dê hemû netewe:
Amîn! bibêjin.

*Bereketan*

3.Mûs 26,3-13

28 Bona girtin û kirina hemû
gotinên Xwedayê xwe

[1] Yanê cîma bike.

[2] Yanê cîh anîna gotinên.

XUDAN, ên ku îroj emirên wan
didim te, ger tu bi qencî gotinên
wî guhdarî bike, dê Xwedayê te
XUDAN te di ser hemû netewe-
yên dinê ve seretetir bike 2 û ger
tu gotina Xwedayê xwe XUDAN
guhdarî bike, dê hemû ev bereke-
tan bi ser te ve werin û bigihêjin
te. 3 Tuyê li bajêr bi bereket be û
li beyarê bi bereket be. 4 Dê hil-
bera bedena te û hilbera erdê te
û hilberê heywanên te û golikên
dewarên te û berxikên keriyên
te, bi bereket bin. 5 Dê selika te
û teşta te yî hevîrê bi bereket bin.
6 Dema tu bikeve hundur, tuyê
bi bereket be û dema tu derkeve,
tuyê bi bereket be.
7 Dê XUDAN neyarên te, yên ku
li dijî te rabûne li ber te bişikîne;
dê li dijî te ji rêyekê ve derkevin
û dê ji ber te ji heft rêyî ve bire-
vin. 8 Di embarên te de û di her
tiştên ku tuyê destê xwe bavêje
de, dê XUDAN bereketê li ser te
ve emir bike û Xwedayê te XU-
DAN di welatê ku dide te de, dê
te bi bereket bike. 9 Û ger tu bi
emirên Xwedayê xwe XUDAN
ve bigire û ger tu di rêyên wî de
bimeşe, mîna ku XUDAN sond
daye te, dê te bona xwe wekî ne-
teweyekî pîroz bisekinîne. 10 Û
hemû neteweyên erdê, dê bibînin
ku tu bi navê XUDAN ve tête
bang kirin û dê ji te bitirsin. 11 Û
li welatê ku XUDAN bona bide
te ji bapîrên te re sond dayiye, dê
XUDAN di hilbera bedena te de
û di hilbera heywanên te de û di
hilbera axa te de, bona qenciyê
zêdeyiyê bide te. 12 Bona barana
welatê te di wexta wê de bide her
karê destê te pîroz bike, dê XU-
DAN ezmanan, xezîneya xwe yî
qenc ji te re veke û tuyê bi deyn
bide gellek neteweyan û tuyê bi
deyn nestîne. 13 Û ger tu bona
girtin û kirinê emirên Xwedayê
xwe XUDAN, ên ku ez îroj ji te
re emir dikim, guhdarî bike 14 û
bona qûlitiyê ji îlahên wekî din re
bike û li pêy wan bimeşe ger tu ji
hemû gotinên ku îroj ji te re emir
dikim, bi rast an jî çepê ve çewt
nebe, dê XUDAN te neke terî, lê
dê bike serî û tuyê tim serete bibe
û tuyê nebe binî.

*Naletan*

3.Mûs 26,14-39

15 Lê belê dê wusa bibe ku, ger
tu bona kirin û girtinê bi hemû
emir û zagonên Xwedayê xwe
XUDAN ên ku îroj ji te re emir
dikim, gotina wî guhdarî neke, dê
hemûya van naletan bi ser te ve
werin û dê bigihêjin te. 16 Tuyê
li bajêr bi nalet be û li beyarê bi
nalet be. 17 Dê selika te û teşta te
yî hevîr bi nalet bin. 18 Hilberê
bedena te û hilberê axa te, golikên
dewarên te û berxikên keriyên te,
dê bi nalet bin. 19 Dema tu bikeve

hundur, tuyê bi nalet be û dema tu
derkeve, tuyê bi nalet be.
20 Ji ber ku te bi karên xwe yî
xerab dev ji min berda, heta ku
tu helaq bibe û heta ku tu bi zûyî
tune bibe, di her karê ku tu bona
kirinê destê xwe bavêje de, dê
XUDAN nalet, şaşitî û pekandinê
bişîne li ser te. 21 Heta ku te ji ser
welatê ku tu bona ji xwe re bike
milk diçê biqedîne, dê XUDAN
webayê bi te ve girê bide. 22 Dê
XUDAN bi weremê, bi tayê, bi
nêmê û bi germiya ku dişewitîne
ve, bi ziwahiyê ve û bi bayê ku ji
çolê tê ve û bi ufnikê ve li te bixe û
heta ku tu tune bibe, dê vana bera
te bidin. 23 Û dê ezmanên li ser
serê te ne, bibin tûnc û erda ku di
bin te de ye, dê bibe hesin. 24 Dê
XUDAN barana welatê te bike toz
û qûm; heta ku tu helaq bibe, dê ji
ezmanan ve dakevin ser te.
25 Dê XUDAN te li ber neyarên
te ve bide şikandin; tuyê li dijî
wan di rêyekê de derkeve û tuyê
ji ber wan ji heft rêyî ve bireve
û tuyê li hemû welatên dinê ve
bibe beredayî. 26 Û dê laşê te ji
hemû civîkên ezmanan re û ji hey-
wanên hov yên erdê re bibe êm[1] û
kesî ku wan birevîne, dê tune be.
27 Dê XUDAN te bi qunêra Misirê
ya ku tu nikarî çêbûnê jê bibîne û
bi girêkan û bi gurîbûnê û bi xurê
ve li te bixe. 28 Dê XUDAN bi
şêtbûnê û bi koritiyê û bi şaşbûna
dil ve li te bixe 29 û zilamê kor
çawa di tariyê de, bi alîkariya dest
ve bimeşe, tuyê jî nîvrojê bi alîka-
riya dest ve bimeşe û tuyê di rêyên
xwe de serfiraz nebe, lê tûyê her
tim di tengasiyê de hatiye hiştin
û hatiye tazî kirin be û dê kesî ku
te xelas bike, tune be. 30 Tuyê bi
pîrekekê re dergistî bibe û dê zila-
mekî din pê re rakeve; tuyê xanî
ava bike û tuyê tê de rûnenê; tuyê
rez biçikîne û fêda wê nebîne.
31 Dê li ber çavê te gayê te bête
serjê kirin û tuyê ji wê nexwe;
dê kerê te bi zorê ji ber te bête
rahiştin û dê ji te re şunda neyê
dayîn; dê dewarên te bidin neya-
rên te û bona te tu kesê ku xelas
bike dê tune be. 32 Dê law û qîzên
te bidin destê neteweyek din û dê
çavên te bibînin û di tûmiya rojê
de bi bêrîkirina wan ve bitefin û
dê tu tişt ji destê te ve neyê. 33 Dê
hemû hilberê zeviya te û hemûya
keda te neteweyek ku tu pê niza-
ne, dê bixwe, lê tuyê tim di tenga-
siyê de bête hiştin û bête eciqan-
din; 34 ji ber, tiştên ku çavên te
dîtine tuyê dîn bibe. 35 Di çongên
te de û di şeqên te de, ji navkoya
lingên te heta serê te[2], dê XUDAN
bi qunêra xerab ya ku tu nikaribe
jê çêbûnê bibîne li te bixe.

---

[1] Alif, xwarin.

[2] Ji serî heta binî.

36 Dê XUDAN te û qiralê ku tu
deyne ser xwe bajo nav netewe-
yek ku tu û bapîrên te, hûn pê ni-
zanin û li wir kevir û dar, tuyê ji
îlahên wekî din re qûlitiyê bike.
37 Û tuyê di nav hemû netewe-
yên ku XUDAN te bişîne nav wan
de, bibe tiştê şaş kirî, methelok û
qerfokî. 38 Tuyê gellekî tovê bibe
zeviyê û hindikî bide hev; ji ber
ku dê kullî wê bixwe û biqedî-
ne. 39 Tuyê rezan dayne[1] û tîmar
bike, lê belê tuyê xemrê venexwe,
tuyê tirî jî nede hev; ji ber ku dê
kurm wan bixwin. 40 Dê di hemû
sînorên te de darên te yî zeytûnê
hebin, lê belê tuyê rûn di xwe de
nede; ji ber ku darên te yên zey-
tûnê dê mêwên xwe biweşînin.
41 Dê law û qîzên te hebin, lê
belê dê nebin yên te; ji ber ku dê
herin dîlitiyê. 42 Dê kullî dor li
hemûyên darên te û hilbera zevi-
ya te bigirin. 43 Xerîbê ku di nav
we de ye her ku ji te seretetir be,
dê zêdetir seretetir bibe û tu her
ku bi jêr ve biçe, tuyê hîn jî bi
jêr ve biçe. 44 Ew ê bi deyn bide
te û tuyê bi deyn nede wî; ew ê
bibe serî û tuyê bibe terrî. 45 Û dê
hemûyên van naletan bi ser te ve
werin û heta ku tu helaq bibe, dê
bera te bidin û bigihêjin te; ji ber
ku tu bona ku bi zagon û emirên
wî ên ku ji te re emir kirine bigire,
te gotina Xwedayê xwe XUDAN
guhdarî nekir 46 û dê ev ê li ser
te û abadîn li ser nîjada te bibin
nîşanêk û nuwaze.
47 Madem ku te ji ber zêdeyiya
her tiştî ji Xwedayê xwe XUDAN
re bi kêfxweşî û bi şabûna dil qûli-
tiyê nekir; 48 ji neyarên te yên ku
XUDAN ji te re bişînin re tuyê di
birçîbûnê de û di tîbûnê de û di ta-
zîbûnê de û di her celebê tunebûnê
de qûlitiyê bike û heta ku te helaq
bike, dê nîrê hesin li ser histuyê te
bixe. 49 Dê XUDAN ji dûr ve, ji
serê dinê neteweyekê, neteweyek
ku tuyê ji zimanê wê fêhm neke,
mîna ku qertel bifire dê bîne ser
te; 50 neteweyek wecê wê tund,
ya ji şexsa kesê pîr bûyî re hur-
metê nake û dilê wan bi zarokan
re naşewite 51 û heta ku te helaq
bike, dê hilberê heywanê te û hil-
berê zeviya te bixwe û heta ku te
biqedîne dê ji te re genim, xemra
nû û rûn û çêlikên heywanên te
û çêlikên mîhên te nehêle. 52 Û
heta ku li hemû welatê te dîwarên
te yên bilind û qayîm, ên ku tu bi
wan ewle ne bikevin, dê li hemû
bajarên te dor li te bigirin û li
welatê ku Xwedayê te XUDAN
daye te, dê li hemû bajarên te dor
li te bigirin. 53 Û di dor girtina
ku neyarên te zorê bidin te û di
tengasiyê de, tuyê hilbera bedena
xwe, goştê law û qîzên xwe yên
ku Xwedayê te XUDAN daye te

1 Biçikîne, biçînî.

bixwe. 54 Di nav we de çavê zi-
lamê ku nazik û zehf narîn e, dê
li dijî birayê xwe û li dijî jina wî
ya ku di himbêza wî de ye û li dijî
zarokên xwe yên ku ji ber mayîne
xerab be 55 û di dorgirtina ku ne-
yarên te li hemû bajarên te de zorê
dide te û di tengasiyê de ji ber ku
tu tişt nemaye, dê ji goştê zarokên
xwe ê ku ew dixwe nede tu kesî ji
wan. 56 Çavê pîreka nazik û narîn
ya ku ji ber nazikbûn û narîntiya
xwe ne elimiye ku navkoya lingê
xwe deyne erdê, dê li dijî mêrê
xwe yî di himbêza wê de ye û li
dijî lawê wê û li dijî qîza wê 57 û li
dijî zarokê ku nû ji rehma wê bûye
û li dijî zarokên ku dê bîne dinê
xerab bibe; ji ber ku di dorgirtina
ku neyarên te dê di bajarên te de
zorê bidin te û di tengasiyê de, ji
ber her tewrê tunebûnê dê wan bi
dizîka bixwin.
58 Bona ku ji navê Xwedanê xwe
XUDAN bi mezintî û hêbet e bi-
tirse, ger tu bona ku wan bike, bi
hemû gotinên vê zagonê ên ku di
vê pirtûkê de nivîsandî ne negire;
59 wê gavê dê XUDAN asîwên te
û asîwên nîjada te, bike tiştekî şaş
kirî, bike asîwên bidûmahî û me-
zin û nexweşiyên xerab û bidû-
mahîk. 60 Û dê hemû nexweşiyên
Misirê ên ku tu ji wan ditirsiya,
dê dîsa bîne ser te û dê bi te ve
bizeliqin. 61 Û heta ku tu helaq
bibe, XUDAN her nexweşî û her
asîwên ku di vê pirtûka zagonê de
nehatine nivîsandin jî bîne ser te.
62 Û hûn ê bi hejmarî hindik bên
berdan, lê belê hûn di zêdeyiyê
de qasî sitêrkên ezmanan bûn; ji
ber ku we gotina Xwedayê xwe
XUDAN guhdarî nekirin. 63 Û
dê wusa bibe, ji ber ku di qenciyê
bi we kirinê û we zêde kirinê de
XUDAN çawa kêfxweş bûbe, ji
ber ku dê we helaq bike û we tune
bike jî dê XUDAN wusa kêfxweş
bibe û hûn ê ji ser welatê ku bona
ji xwe re bikin milk dikevinê bên
qetandin.
64 Û dê XUDAN we ji nîçikekê
erdê heta nîçikê din di nav hemû
neteweyan de belav bike û li wir
tuyê ji dar re, ji kevir re, ji îlahên
wekî din ên ku bapîrên te pê ni-
zanîbûn re qûlitiyê bike. 65 Û
tuyê di nav wan neteweyan de re-
hetiyê nebîne û dê bona navkoya
lingê te cîhê rawestinê tune be û
dê XUDAN li wir dilekî dilerize,
tefandina çav û bêdermaniya can
bide te 66 û dê li ber te jiyana te
di hejandinê de be û tuyê bi şev û
roj bitirse, tuyê bi jiyana xwe ve
ewle nebe. 67 Ji ber tirsa ku dilê
te dagirtiye û ji ber tiştên ku ça-
vên te dîtine, tuyê sibehê: Xwezî-
ka êvar biba! bibêje û êvarî: Xwe-
zîka sibeh biba! bibêje. 68 Û rêya
ku ji te re: Êdî tuyê carekî din wê
nebîne! gotime, dê XUDAN dîsa
bi keştiyan te bîne Misirê û li wir

hûn ê xwe bi dîl û cariyetiyê ji
neyarên xwe re derxînin firotinê û
kesî ku we bistîne dê tune be.

*Nûkirina Peymanê li Welatê Moabê*
5.Mûs 4,32-40; Yêşû 24,14-27

29 Xeynî peymana ku XUDAN
li Horebê bi lawên Îsraêl re
kiribû, gotinên peymana ku bona
li welatê Moabê bi wan re deyne ji
Mûsa re emir kiriye ev in.
2 Û Mûsa bangî hemûya Îsraêlê
kir û ji wan re got: Hemû tiştên ku
XUDAN li welatê Misirê, li ber
çavên we ji Fîrawûn re û ji hemû
qûlên wî re û ji hemûya welatê wî
re kiriye, 3 ceribandinên mezin
ên ku çavên we dîtine, elametan û
wan nuwazeyên mezin we dîtin;
4 lê belê heta niha XUDAN, bona
zanînê dil û bona dîtinê çavan û
bona bihîstinê guhan neda we. 5 Û
çel salî we di çolê de meşandim;
kincê we li ser we kevin nebû û di
lingê te de çaroxa te kevin nebû.
6 Bona ku hûn bizanibin Xwe-
dayê we XUDAN ez im, we nan
nexwarin û xemr û alkolên din[1]
venexwarin. 7 Û dema hûn hatin
vî cîhî, Sîhonê qiralê Heşbonê û
Ogê qiralê Başanê, li dijî me, bona
cengê derketin û me li wan xistin
8 û me welatên wan stendin û wê
bi mêrasî dan Rûbeniyan û Gadi-
yan û nêviyê ezbeta Manaşşiyan.
9 Bo vê yekê bona ku hûn di her
tiştî de serfiraz bin, gotinên vê
peymanê bigirin û wan bikin[2]!
10 Îroj hûn, serekên we, kalepîrên
we û pêşhatiyên we, hemûyên
zilamên Îsraêlê, 11 zarokên we,
pîrekên we û xerîbên ku di hundirê
qesrên we de ne, ji yê ku êzingê we
jêdike heta yê ku ava we dikişîne,
hûn gişt li ber Xwedayê xwe XU-
DAN ve sekinîne; 12 da ku, tu
bikeve peymana Xwedayê xwe
XUDAN û sonda ku Xwedayê te
XUDAN îroj bi te re dike 13 û bila
îroj te bona xwe bi neteweyî bise-
kinîne û wekî ji te re gotiye û mîna
ku ji bapîrên te re, ji Birahîm, Îs-
haq û Aqûp re sond dayiye bila ji
te re bibe Xwedê.
14 Û ez vê peymanê û vê sondê ne
tenê bi we re, 15 lê belê ez bi yên
ku îroj bi me re li ber Xwedayê me
XUDAN û bi yên ku îroj bi me re
li vir nesekinîne re jî dikim. 16 Ji
ber hûn pê dizanin ku em çawa li
welatê Misirê rûdiniştin û çawa ji
nav neteweyên ku em ji nav wan
ve derbas bûn, derbas bûyîne 17
û we tiştên wanî mekrûh û pûtên
wanî dar û kevir, zîv û zêr ên ku
di nav wan de bûn dîtin; 18 da ku,
bila di nav wan de zilamek, an jî
pîrekek, an jî eşîrek, an jî ezbetek
nebe ku bona îroj here û ji îlahên
wan re qûlitiyê bikin, dilê wî ji

1 Vexwarin, araq.
2 Bînin cîh.

Xwedayê me XUDAN ve vegere û bila di nav we de reha ku ziravik an jî pelînê[1] dide tune be 19 û bila nebe ku, dema gotinên vê sondê bibihîze, bila bi gotina: Ez çiqas di inyada dilê xwe de bimeşim dê ji min re xweşî[2] bibe! bona ter û hişk[3] pev re tune bike, bila di dilê xwe de xwe pîroz neke. 20 Dê XUDAN nexwaze lê biborîne, lê belê dê wê gavê çavnebarî û hêrsa XUDAN li dijî wî zilamî xurî bide[4] û hemûya naletên ku di vê pirtûkê de nivîsandî ne, dê li ser wî dakevin û dê XUDAN navê wî ji bin ezmanan ve paqij bike. 21 Û dê XUDAN li gor hemû naletên peymana ku di vê pirtûkê de nivîsandî ne, wî bona asîwê ji hemû ezbetên Îsraêlê ve cuda bike.

22 Û nifşeya ku were, lawên we yên ku dê li pêy we rabin û biyanê ku ji welatekî dûr ve were, asîwên vî welatî û nexweşiyên ku XUDAN wan şandine[5] û 23 dema bibînin ku wekî xerabûna Adma û Tseboîm û Sodom û Gomoraya ku XUDAN di hêrsa xwe de wê bi serî û binî kiriye, hemû welatê wî bi kewkurd û xwê û bi şewat e û nayê çandin û berê nade û tê de gîhayê hêşîn şîn nayê, dê hemûyên neteweyan jî biaxifin û bibêjin: 24 Gelo çima XUDAN vêya bi vî welatî kir? Û xeyda vê hêrsa mezin gelo ji ber çi ye? 25 Dê wê çaxê bibêjin: Ji ber dev ji peymana ku Xwedayê bapîrên xwe XUDAN dema wan ji Misirê derxist bi wan re kiribû, berdan 26 û çûn û ji îlahên ku bi wan nizanin û ji wan re bi parî nehatine dayîn re qûlitiyê kirin û ji wan re secde kirin 27 û bona hemû naletên di vê pirtûkê de nivîsandî ne bîne serê vî welatî, hêrsa XUDAN li dijî wê sor bû 28 û XUDAN bi hêrsê û bi xezebê û bi hêrsa mezin wan ji welatên wan ve veqetandin û mîna ku îroj wusa ye, wan avêt welatekî din! 29 Tiştên veşartî yên Xwedayê me XUDAN in; lê belê heçî tiştên ku bona em hemû gotinên vê zagonê bikin hatiye derketinî holê, abadîn yên me ne û yên lawên me ne.

*Qaîdeyên başbûn û Pîrozbûnê*

3.Mûs 26,40-45; Yêr 29,10-14; Yêr 30-33; Hêz 36-37

30 Hemû van tiştan, bereket û naleta ku danîme ber te, dema werin ser te û dema di nav hemû neteweyên ku Xwedayê te XUDAN te ajotiye nav wan de tu wan di bîra xwe de bînî 2 û vege-

---

1 Gîhayê tahl.
2 Aştî.
3 Ziwa.
4 An jî: Sor bibe.
5 An jî: ...nexweşiyên ku XUDAN wan şandiye.

re Xwedayê xwe XUDAN û tu û
lawên te, li gor her tiştên ku îroj
emirên wan li te dikim, dema tu
gotina wî bi hemû dil û canê xwe
guhdarî bikî, 3 dê wusa bibe ku,
dê Xwedayê te XUDAN sirgûna
te vegerîne û li ber te bikeve û dê
vegere û dê Xwedayê te XUDAN
te ji hemû neteweyên ku te li van
belav kirine bide hev[1]. 4 Yên te
ên ku hatine ajotin ger li nîçikê
ezmanan jî bin, dê Xwedayê te
XUDAN te ji wir bide hev û te ji
wir rahêle 5 û dê Xwedayê te XU-
DAN te bîne welatê ku bapîrên
te ji xwe re kirine milk û tuyê wê
ji xwe re bike milk û dê ji te re
qenciyê bike û dê te ji bapîrên te
zêdetir pirr bike. 6 Û bona ku tu
ji bo bi hemû dil û canê xwe ji
Xwedayê xwe XUDAN ve hez
bike bijî, dê Xwedayê te XUDAN
dilê te û dilê nîjada te sunet bike.
7 Û dê Xwedayê te XUDAN
hemûyên van naletan deyne ser
neyarên te yên ku tahde li te kirine
û yên ku ji te dikerihin. 8 Û tuyê
vegere û gotina XUDAN guhdarî
bike û bi hemû emirên ku îro li te
emir dikim bike. 9 Û Xwedayê
te XUDAN, bona ku ji te re bibe
qencî, di her karê destê te de, di
hilbera bedena te de û di hilbera
heywanên te de û di hilbera axa
te de dê te bi bereket bike; ji ber
ku bona ji te re bibe qencî dê XU-
DAN ji ber te kêfxweş bibe; çawa
ku ji ber bapîrên te kêfxweş bûbû.
10 Ger tu bona girtina emir û za-
gonên Xwedayê xwe XUDAN, ên
ku di vê pirtûka zagonê de nivî-
sandî ne, gotina wî guhdarî bike;
ger tu bi hemû dil û canê xwe ve-
gere Xwedayê xwe XUDAN.
11 Ji ber ev emrê ku îroj li te di-
kim, bona te ne zor e û ji te ne dûr
e. 12 Ew ne li ezmana ye ku tu
bibêje: Ka kî dê bona me hilkişe
ezmanan û bona me wê bîne û
bi me re bide bihîstin ku em wê
bikin? 13 Û ew ne ji behrên wê-
detir e ku tu bibêje: Ka kî dê bona
me derbasî aliyê dinî behrê bibe û
bona me wê bîne û bi me re bide
bihîstin ku em wê bikin? 14 Lê
belê bona ku tu bike ew gotin[2]
zehf nêzîkî te ye, di devê te de û
di dilê te de ye.

*Hilbijêrtina Jiyan û Mirinê*

5.Mûs 11,26-28

15 Binêre, ez îroj jiyan û qenciyê
û mirin û xerabiyê datînim ber te;
16 ji ber ku îroj ez ji te re ji Xwe-
dayê xwe XUDAN ve hezkirinê û
di rêyên wî de meşandinê û bi emir
û zagon û daraziyên wî girtinê emir
dikim, da ku, tu bijî û zêde bibe û
li welatê ku bona tu ji xwe re bike
milk tu diçê, bila Xwedayê te XU-

---

1 Bicivîne.

2 Gotina Xwedê.

DAN te pîroz bike. 17 Lê belê ger
dilê te bizivire û tu guhdarî neke û
xwe pê ve berde û ji îlahên wekî
din re secde bike û ger tu qûlitiyê
ji wan re bike; 18 ez îroj ji te re di-
gehînim ku, muheqeq hûn ê tune
bibin; li welatê ku bona ji xwe re
bikin milk, hûn ê ji Urdunê derbas
bibin û bikevinê dê temena we dirêj
nebe. 19 Ez îroj erd û ezmanan li
dijî we şahde digirim ku jiyan û mi-
rinê û bereket û naletê danîme ber
te; ji bo vê yekê jiyanê hilbijêre,
20 da ku, bona ji Xwedayê xwe
XUDAN hez bike, gotina wî guh-
darî bike û bona ku pê re girêdayî
bimîne tu û nîjada te bila bijîn; ji
ber ku jiyana te û dirêjiya rojên te
ew e; da ku, tu li welatê ku XU-
DAN bona bide bapîrên te, ji Bi-
rahîm, Îshaq û Aqûp re, bona ku
bide wan sondê dayiye, rûnê.

*Dê Yêşû cîhê Mûsa bigire*

5.Mûs 3,21-28; Yêşû 1,1-9

31 Û Mûsa çû û van gotinan
ji hemûya Îsraêlê re got. 2
Û ji wan re got: Ez îroj sed û bîst
salî me; êdî bona derketin û ketinê
qudreta min nîne û XUDAN ji min
re: Tuyê ji vê Urdunê ve derbas
nebe! got. 3 Yê ku dê ji ber te ve
derbas bibe Xwedayê te XUDAN
e; yê ku dê ji pêşiya te ve van gelan
helaq bike, ew e û tuyê milkên wan
rahêje û mîna ku XUDAN gotiye,
yê ku ji pêşiya te ve derbas bibe
Yêşû ye. 4 Û XUDAN ji qiralên
Amoriyên ku wan helaq kiriye re,
wekî ji Sîhon û Og re û li welatên
wan re kiriye dê ji vana re jî bike.
5 Û dê XUDAN li ber we wan bide
dest û li gor hemû emrê ku ji we
re emir kirime hûn ê li wan bikin.
6 Xwurt bin û dilawêr[1] bin, metirsin
û ji wecê wan bêzar nebin! Ji ber yê
ku bi te re dimeşe, Xwedayê te XU-
DAN e; te li valahiyê dernaxe û dev
ji te bernade. 7 Û Mûsa bangî Yêşû
kir û li ber çavê hemûya Îsraêlê jê
re got: Xwurt be û dilawêr be! Ji
ber ku tuyê bi vê netewê re bikeve
welatê ku XUDAN bona bide wan
ji bapîrên te re sond dayiye û tuyê
wê bi mêrasî li wan par bike. 8 Û
yê ku di pêşiya te de dimeşe XU-
DAN e; ew ê bi te re be, te li va-
lahiyê dernaxe û dev ji te bernade;
netirse û nekeve bêzariyê!

*Xwendina Zagonê*

2.Dîr 34,29-32; Neh 8,1-12

9 Û Mûsa vê zagonê nivîsand û wê
da lawên Lêwî ên ku Sindoqa Pey-
manê ya XUDAN dikişînin, kahîn-
an û hemû kalepîrên Îsraêlê. 10 Û
Mûsa emir da wan û got: Paşî her
heft salî, di demekî eşkere ya sala
rûsipîtiyê de, di cejna haymeyan
de, 11 hemûya Îsraêlê li ber Xwe-
dayê te XUDAN, di dema bona li
cîhê ku wî hilbijartiye de xuyanî

[1] Wêrek, cesûr.

bibe were, vê zagona li ber hemûya
Îsraêlê, ji bo ku bi guhên xwe ve
bibihîzin, tuyê ji wan re bixwî-
ne. 12 Netewê, zilaman û pîrekan
û zarokan û xerîbên te yên ku di
bajarên te de ne bicivînin, da ku,
bila bibihîzin û hîn bibin û bila ji
Xwedayê we XUDAN ve bitirsin
û bona kirina hemû gotinên vê za-
gonê bila pê bigirin 13 û lawên ên
ku pê nizanin jî bila bibihîzin û li
welatê ku hûn bona ji xwe re bikin
milk, hûn ji Urdunê ve derbasî wê
dibinê de, di hemû rojên ku hûn ê
lê bijîn de, bila ji hînî ji Xwedayê
me XUDAN ve tirsînê bibin.

*Emirê dawîn ya Xudan ji Mûsa re*
5.Mûs 32

14 Û XUDAN ji Mûsa re got: A
vay, rojên ku tuyê bimire nêzîk di-
bin; bangî Yêşû bike û bona ku ez
emir bidim wî, di Çadira Civandinê
de amade bibin. Û Mûsa û Yêşû
çûn û di Çadira Civandinê de ama-
de bûn. 15 Û XUDAN di Çadirê de,
di sitûna ewran de xuyanî bû û sitû-
na ewrê li ser deriyê Çadirê sekinî.
16 Û XUDAN ji Mûsa re got: A
vay, tuyê bi bapîrên xwe re rakeve
û dê ev netewe rabe, li pêy îlahên
biyan ên welatê ku bona di nav wan
de bin diçinê, dê zinê bikin û dev ji
min berdin û dê peymana ku bi wan
re kirime xera bikin. 17 Û dê wê rojê
li dijî wan hêrsa min sor bibe û ez ê
dev ji wan berdim û ez ê wecê xwe
ji wan veşêrim û ew ê bên xwarin
û biqedin[1] û dê zehf xerabî û ten-
gasî bigihêje wan û dê ew wê rojê
bibêjin: Ma ne ji ber ku Xwedayê
me ne di nav me de ye, ev xerabî
gehîştin me? 18 Û ji ber hemû xe-
rabiya ku bi îlahên wekî din vegerê
ve kirine, ez ê wê rojê muheqeq
wecê xwe veşêrim. 19 Û niha bona
xwe vê qesîdeyê binivîsînin û tuyê
wê hînî lawên Îsraêl bike; bixe devê
wan, da ku, bila ev qesîdeya li dijî
lawên Îsraêl bona min bibe şahde.
20 Ji ber ku ez ê wan bînim welatê
ku jê şîr û hungiv diherikin, ê ku
ji bapîrên wan re sond xwarime û
dema bixwin û têr bibin û qelew
bibin, dê bizivirin îlahên wekî din
û ji wan re qûlitiyê bikin û dê min
biçûk bibînin û peymana min xera
bikin. 21 Û dê wusa bibe ku, dema
zehf xerabî û tengasî bigihêje wan,
dê ev qesîde li ber wan şahdebûyînê
bersivê bide; ji ber ku dê di devê
nîjadên wan de neyê ji bîr kirin; ji
ber, berî ku ez wan bibim welatê ku
sondê dayîme, îroj ez bi gumreşiya
ku difikirin û rêz dikin ve dizanim.
22 Û wê rojê Mûsa vê qesîdeya ni-
vîsand û wê hînî lawên Îsraêl kir.
23 Û emir li Yêşûyê lawê Nûn ve
kir û got: Xwurt be û dilawêr be! Ji
ber ku tuyê wan bibe welatê ku ji
lawên Îsraêl re sond dayîme û ez ê
bi te re bim!

---
1 Mexlûb bibin.

24 Û wusa bû ku, Mûsa heta hemû
gotinên vê zagonê temam bibin,
dema wan di pirtûkekê de nivî-
sandinê qedand, 25 Mûsa emir da
Lêwiyiyên ku Sindoqa Peymanê
ya XUDAN dikişînin û got: 26 Vê
pirtûka zagonê rahêlin û wê li cem
Sindoqa Xwedayê we XUDAN,
bona ku li dijî te bibe şahde deynin.
27 Ji ber ku ez bi serîhildana te û
histuyê te yî hişk ve dizanim; a vay,
îroj hîn di nav we de dijîm[1], lê hûn
li dijî XUDAN asê bûn; hûn ê paşî
mirina min çiqasî zêdeyî bibin asê!
28 Hemû kalepîrên ezbetên xwe
û pêşhatiyên xwe li cem min bici-
vînin û bona ku bila bi guhên xwe
ve bibihîzin ez van gotinan ji wan
re bibêjim û ez li dijî wan erd û ez-
manan şahde bigirim. 29 Ya na ez
dizanim ku hûn ê paşî mirina min
bitûmî xera bibin û ji rêya ku emrê
wê li we dikim çewt bibin û dê di
rojên dawîn de xerabî pêrgîniya
we bikin, ji ber ku hûn ê bi karên
destên xwe ve bona XUDAN bi
hêrs bikin, hûn ê ya ku di çavê wî
de xerab e, bikin.

*Qesîda Mûsa*

5.Mûs 31,16-22; 31,28-30

30 Û Mûsa heta gotinên vê qesî-
deyê temam bûn, wan ji hemûya
civaka Îsraêlê re bona ku bi guhên
xwe ve bibihîzin got.

32 Ya ezmanno guh bidin û ez
ê bibêjim û bila erd gotinên
devê min bibihîze[2]!
2 Dê fêrkirina min mîna baranê
dilop bibe; dê gotina min bikeve,
mîna xunavê, mîna li ser çîme-
nan baranên sivik û li ser gîhayan
mîna rêjneyan!
3 Ji ber ku ez ê navê XUDAN bi-
dim bang kirin; mezintiyê bidin
Xwedayê me!
4 Ew zinar e, karê wî bitûmî ye;
ji ber ku hemû rêyên wî heq in;
xwedayê dilsoziyê ye û neheqiyê
nake; yê ku dilsoz û rast e ew e!
5 Li dijî wî fesadiyê kirin, ne
lawên wî ne, şerma wan in;
nifşeyek xwar û eks in.
6 Ya netewa bêaqil û bêhîkmet, ma
hûn vê berdêla didin XUDAN? Ma
bavê te yê ku xwediyê te ye, ne ew
e? Te afirand û te zeximand.
7 Rojên kevin bînin bîra xwe, bala
xwe bide salên gellek nifşeyan; ji
bavê xwe bipirse, dê ji te re bighî-
ne; ji kalepîrên xwe re bipirse, dê
ji te re bibêjin.
8 Dema Yê Bilind mêrasên nete-
weyan par bike, dema zarokên mi-
rovan cihê kir, li gor hejmara lawên
Îsraêl, sînorên neteweyan danî.
9 Ji ber ku para XUDAN netewa
wî ye; Aqûp para mêrasa wî ye.
10 Wî li warekî ziwa û li çolekî
tenha û diûre de dît; dor lê girt û

[1] An jî: Hîn bi we re sax im.

[2] Dinya, yanê: Bila dinya gotinên devê min bibihîze!

bi ser re girt, mîna bîboka çavê
xwe wî parast.
11 Mîna qertela ku tevgerê tîne
hêlîna xwe û li ser çêlikên xwe
baskan diçerpîne, baskên xwe ra-
xistin û wan rahişt, wan li ser bas-
kên xwe ve kişand.
12 Tena xwe XUDAN rê nîşanî wan
kir û tevî wî îlahê biyan tune bû.
13 Wî li ser bilindahiyên erdê ve
siwar kir û berê zeviyê xwar û
ji zinarê bi wî hungiv û ji kevirê
çeqmaqê rûn da mêtandin.
14 Tevî bezên berxikan, dewên
çêlekan û şîrên mîhan û bi ge-
nimê herî qenc re, ji cinsê Başanê
beranan û nêriyan, te xwar û te ji
xwîna tiriyan xemrê vexwar.
15 Lê belê Yêşûrûn qelew bû û
şûn de avêt[1]; tu qelew bû, qalind
bû û te bez girt! Wê çaxê dev ji
Xwedayê ku wî afirandiye berda
û zinarê xelasiya xwe biçûk dît.
16 Bi îlahên biyan re çavnebarti-
yê lê kirin; bi tiştên mekrûh ve wî
hêrs kirin.
17 Ji cinên ku ne Xweda ne, ji îlahên
ku pê nizanin, îlahên van demên
dawîn derketine. Ên ku bapîrên we
ji wan natirsin re qurban kirin.
18 Te zinarê ku te qewimandiye ji
bîra xwe ve derxist û te Xwedayê
ku te afirandiye ji bîr kir.
19 Û XUDAN dît û ji wan kerihî,
ji ber ku law û qîzên wî, wî hêrs
kirin.
20 Û got: Ez ê wecê xwe ji wan
veşêrim, ka dawiya wan çawa
dibe ez bibînim; ji ber ku ew
nifşeyek zehf eks e, lawên ku di
wan de dilsozî nîne ne.
21 Bi yê ku ne Xwedê ye çavne-
bartiyê li min kirin; bi tiştên ne-
rast[2] min hêrs kirin; ez ê jî bi yên
ku ne netew in ve çavnebartiyê li
wan bikim; bi neteweyek bêaqil
wan hêrs bikim.
22 Ji ber ku di hêrsa min de pê-
tek bi agir ve ket û heta binê warê
miriyan dişewite û erdê[3] û berê
wê dixwe û diqedîne û bingehên
çiyayan pê dixe.
23 Ez ê xerabiyan li ser wan kom
bikim; ez ê tîrên xwe li dijî wan
biqedînim.
24 Dê ji xelayê biqedin û bi
germa bi agir û dê bi helaqa
tahl ve bên xwarin û qedandin
û ez ê jahra yên ku ji erdê ve xîj
dibin û diranên cenawiran bişînim
dijî wan.
25 Him yê egîd, him jî qîzê, za-
rokê di pêsîrê de û zilamê por sipî,
dê ji derve şûr û ji hundir jî toqîn
biqelihînin.
26 Min ê bigota: Ez wan bi dûr
ve belav bikim, ji nava mirovan
bîranînên wan rakim!

1 Şûn de pincik avêt.
2 Vala.
3 Dinê.

27 Ger ez ji hêrsa neyarê xwe ve
netirsiyama; bona ku bila neyar
çewt fêhm nekin û nebêjin: Yê ku
hemûyên vana kirine, ne XUDAN
e, destê me seretetir bû!
28 Ji ber ku ew neteweyek ûsa ye
ku şîretên wan nîne û di wan de
fêhmkarî nîne.
29 Xwezîka bi zanyar bibûna,
vêya fêhm bikirana, dawiya xwe
bifikirana!
30 Ger Zinarên wan, wan nefiro-
tiba û XUDAN wan nedaba dest,
ma çawa zilamek bera pey hezar·
kesî dida û du kes deh hezar kesî
direvandin?
31 Ji ber ku zinarê wan ne mîna Zi-
narê me ye, yê di derheqê vê yekê
de daraziyê daye jî neyarê me ye!
32 Ji ber ku mêwa wan ji mêwa
Sodomê û ji zeviyên Gomorrayê
ne; tiriyên wan tiriyê ziravikê ne,
goşiyên wan tahl in;
33 Xemra wan jahra maran û jahra
margîskan ya ku dukuje ye.
34 Ma ev tişt li cem min ne veşartî
û di nav xezîneyên min de ne
morkirî ye?
35 Dema lingên wan bişemitin,
tol û ceza yên min in; ji ber ku
roja wanî qedayê nêzîk e û tiştên
ku werin serên wan, dê zû werin.
36 Ji ber ku dê XUDAN serwe-
riyê li netewa xwe bike û dema
bibîne ku hêza wan diçike, zilamê
dîl û azad nemaye, dê dilê wî li
qûlên xwe ve bişewite.
37 Û dê ew bibêje: Zinarê ku xwe
sipartine, îlahên wan ka li ku derê
ne? De bila rabin û alîkariyê bi we re
bikin, bila ji ser we re bibin rûpişt;
38 Yê ku rûnê qurbanên xwe di-
xwe, xemra pêşkêşiyên xwe yên
rijandinê vedixwe!
39 Niha bibînin ku ez, ez ew im û
li cem min îlah nîne! Ez dukujim
û ez divejînim; ez birîndar dikim
û ez baş dikim û kesî ku ji destê
min ve xelas bike nîne!
40 Ji ber ku ez destê xwe berbi
ezmanan ve radikim û dibêjim:
Bona heqê hebûna minî abadîn!
41 Ger ez şûrê xwe yî birûskan
davêje tûj bikim û serweriyê bi-
girim destê xwe, ez ê ji neyarên
xwe ve tolê hildim û ez ê bidim
yên ku ji min ve dikerihin.
42 Ji xwîna yên ku hatine kuştin
û hatine dîl kirin, ji serê serokên
neyaran, ez ê tîrên xwe bi xwînê
ve serxweş bikim û dê şûrê min
goşt bixwe.
43 Ya gelno; bi netewa wî re
kêfxweş bibin! Ji ber ku dê tola
xwînên qûlên xwe hilde û dê bi
tolhildanê bersivê bide neyarên
xwe û dê bona welatê xwe, bona
netewa xwe kefaretê bike.
44 Û Mûsa tevî Hoşeyayê[1] lawê
Nûn hat û hemû gotinên vê qesî-

[1] Hoşeya: Navê Yêşû, yê din e, (yanê navê wî yê duwemin e).

deyê bi gel ve dan bihîstin û got.
45 Û Mûsa ji hemûya Îsraêlê re
gotina hemûyên van gotinan qedand
46 û ji wan re got: Dilê xwe
bixin hemû gotinên vê zagona ku hûn ê bona bigirin û bikin ji lawên xwe re emir bikin, hemû gotinên ku îroj ez ji we re şahdeyiyê dikim.
47 Ji ber ku ev bona we ne tiştekî vala ye; ji ber ku ev jiyana we ye û li welatê ku hûn bona ji xwe re bikin milk ji Urdunê ve derbas dibinê, dê temena we bi vêya ve dirêj bibe.

*Mirina Mûsa ji berê ve jê re tête gotin*

5.Mûs 34,1-4

48 Û XUDAN di eynî rojê de bi Mûsa re axifî û got:
49 Hilkişe vî çiyayê Neboyê, çiyayê Abarîmê yê ku li hemberî Erîhayê, li welatê Moabê yî û welatê Kenanê yê ku ez bi milkî didim lawên Îsraêl bibîne
50 û mîna ku birayê te Harûn li çiyayê Horê mir û beşdarî neteweya xwe bû, tu jî li çiyayê ku tuyê hilkişe de bimire û beşdarî netewa xwe bibe;
51 ji ber ku li çola Tsînê, di avên Merîba-Kadeşê de we di nav lawên Îsraêl de êrîşî min kirin; ji ber ku we di nav lawên Îsraêl de min pîroz nekirin.
52 Ji ber ku tuyê ji hember ve welêt bibîne, lê belê tuyê nekeve wir, welatê ku ez didim lawên Îsraêl.

*Mûsa Eşîrên Îsraêlê Pîroz dike*

1.Mûs 49,1-28

33 Û duaya xêrê ya ku zilamê Xwedê Mûsa berî mirina xwe ji lawên Îsraêl re xwendiye, ev e.
2 Û got:
XUDAN ji Sînayê ve hat û ji wan re ji Seîrê ve derket[1], ji çiyayê Paranê ve biriqî û ji nav deh hezarên pîrozan ve hat; bona wan li aliyê wî yê rastê fermana bi agir hebû.
3 Belê, ew ji gelê[2] xwe hez dike; hemû pîrozên wî di destê te de ne û ew li cem lingê te rûniştin; dê her yek ji gotinên te ve rahêlin.
4 Bona civaka Aqûp bi mêrasî, Mûsa emrê zagonekê li me kir.
5 Û wekî hemû ezbetên Îsraêlê pev re bin, dema serekên netewê civiyan, ew li Yêşûrûnê qiral bû.
6 Bila Rûben bijî û nemire; bila zilamên wî bi hejmarî kêm nebin!
7 Ya ku bona Cihûda ev e û got:
Ya XUDAN, dengê Cihûda bibihîze, wî bîne nav netewa wî. Bona xwe bi destên xwe ve şer kir û tuyê li dijî neyarên wî ji wî re alîkar be!
8 Û bona Lêwî got:
Tûmmîmîn û Ûrimîna te, ji bo qûlê te yî dilsoz; yê ku te li Massayê wî ceriband û di avên Merîba de pê re ketî keftûleftê ne.
9 Ew di derheqê bavê xwe de û di derheqê dayika xwe de: Wan ne-

1 An jî: Hilhat.

2 Ezbetan, an jî: Netew.

dîtim got û birayên xwe nas nekir
û ji lawên xwe ve nezan bû; ji ber
ku bi gotina te ve girtin û peyma-
na te diparêzin.
10 Ew ê daraziyên te hînî Aqûp
û zagona te hînî Îsraêlê bikin û
dê buxurê deynin ber te û hemû
pêşkêşiya şewitandinê deynin ser
pêşkêşîgeha te.
11 Ya XUDAN, malê wî pîroz
bike û ji karê destê wî ve razî be;
pişta yên ku li dijî wî rabûne û jê
dikerihin, bona ku carekî din ra-
nebin bişkîne!
12 Bona Benyamîn got: Evîndarê
XUDAN! dê li cem wî di ewleka-
riyê de rûnê; di tûmiya rojê de wî
duxumîne û di nav sermilên wî de
rûdine.
13 Û bona Ûsiv got: Ji aliyê XU-
DAN ve welatê wî, bi tiştên birû-
met ên ezmanan, bi xunavê û di
kûraniya ku li jêr radikevin,
14 Û bi tiştên zadê rojê ên biqîmet
û bi tiştên birûmet ên ku mehan
wan ava kirine,
15 Û bi tiştên qenc ên çiyayên qe-
dîm û bi tiştên girên abadîn yên
bi qîmet,
16 Û bi tiştên erdê ên bi qîmet û bi
tijîbûna wan û bila bi razîbûna yê
ku li devîgehê ye pîroz be. Bila be-
reket were ser serê Ûsiv; ser serê
yên ku ji birayê xwe ve cuda ye!
17 Ganêrê ku pêşiyê bûye, rew-
naqî ya wî ye û qiloçên wî qi-
loçên dewarê kov e; bi wan ve
neteweyan pev re dê nîçikên
dinê qiloç bikin û ew deh he-
zarên Efrayîm in û ew hezarên
Manaşşeyê ne.
18 Û bona Zebûlûn got: Ya Ze-
bûlûn, tu bi derketina xwe ve û
ya Îssakar tu bi çadirên xwe ve
kêfxweş be!
19 Dê ew ê neteweyan bangî çiyê
bikin; dê li wir qurbanên xwe yî
çêbûnê pêşkêş bikin; ji ber ku
dê zêdeyiya behrê û xezîneyên
veşartî yên qûmê bimêjin.
20 Û bona Gad got: Yê ku Gadê
fireh bike, bila pîroz be! Mîna şêrê
mê rûdinê, mil û serî jî diperçiqîne.
21 Û bona xwe beşa pêşîn hil-
bijart, ji ber para yê ku zagonê
datîne li wir hatibû veşartin û bi
serekên netewê ve hatin; dadiya
XUDAN û daraziyên wî bi Îs-
raêlê re anîn cîh[1].
22 Û bona Dan got: Dan çêlika
şêrê ye, yê ku ji Başanê ve êrîş
dike.
23 Û bona Naftalî got: Ya Nafta-
liya bi bereketa XUDAN ve tijî û
bi bexşê ve têr! Tu rojava û başûrê
ji xwe re bike milk!
24 Û bona Aşer got: Bila Aşer
bi lawan ve pîroz bibe; bila ji bi-
rayên xwe re meqbûl be û lingê
xwe di rûnê de dake!
25 Dê çilmêreyên te yên deriyan
hesin û tûnc bin û rojên te çawa

[1] Çêkirin.

bin, dê quweta te wusa be!
26 Xwedayek mîna yê Yêşûrûn
nîne ku, bona alîkariya te bi me-
zinahiya xwe li erşê û li ewran
siwar bûye.
27 Cîhê ku tu xwe bisitirîne Xwe-
dayê qedîm e û bazûyên abadîn te
dikişînin. Û neyar ji ber te ve qe-
wirand û: Helaq bike! got.
28 Û li warê genim û xemra nû
de, tena xwe çavkaniya Aqûp, Îs-
raêl di ewlekariyê de rûdinê; ez-
manên wî jî xunavê dilop dikin.
29 Ya Îsraêl, netewa ku ji
aliyê XUDANê ku mertala alî-
kariya xwe û şûrê mezintiya xwe
ve hatiye xelas kirin. Tu çiqas dil
xweş e! Ma wekî te kî heye? Û
dê neyarên te çaplûsiyê li te bikin
û tuyê cîhên wan yên bilind bi-
pelixînî[1]!

*Mirina Mûsa*
5.Mûs 32,48-52

34 Û Mûsa ji deştên Moa-
bê, hilkişiya girê Pîsgaya
çiyayê Nebo, ya ku li hemberî
Erîhayê ye. Û XUDAN welêt,
heta Danê hemûya Gîleadê 2
û hemûya Naftaliyê û welatê
Efrayîm û Manaşşeyê û heta
behra rojavayê hemûya welatê
Cihûdayê 3 û başûrê û heta Tsoarê
tejaneya newala Erîhayê ya ku
bajarekî xurmê ye nîşanî wî da.
4 Û XUDAN jê re got: Welatê
ku ji Birahîm re, ji Îshaq û Aqûp
re bi gotina: Ez ê bidim nîjada
te sond xwarime ev e; min wê
bi çavên te ve nîşanî te dam, lê
belê tuyê derbasî wê derê nebe!
5 Û li gor gotina XUDAN, qûlê
XUDAN Mûsa li wir, li welatê
Moabê mir. 6 Û li welatê Moa-
bê, li newala ku li hemberî Beyt-
Peorê wî binax kir; lê belê heta
îroj tu kes gora wî nizane. 7 Û
dema Mûsa mir sed û bîst salî bû;
çavê wî qels nebû û quweta wî
kêm nebû. 8 Û lawên Îsraêl, di
deşta Moabê de sîh rojî ji Mûsa re
giriyan û bona Mûsa rojên şîn û
giriyê temam bûn.
9 Û Yêşûyê lawê Nûn bi ruhê
hîkmetê ve tijî bû; ji ber ku Mûsa
destên xwe danîbû ser wî û lawên
Îsraêl li wî guhdarî dikirin û wekî
ku XUDAN emir dabû Mûsa di-
kir. 10 Lê belê êdî li Îsraêlê pey-
xamberekî mîna Mûsa, yê ku
XUDAN rû bi rû dizane, deme-
ket. 11 Û XUDAN ew ji bona ku
li welatê Misirê ji Fîrawûn re û ji
hemû qûlên wî re û hemû welatê
wî re nuwaze û elametan bike,
şand. 12 Û Mûsa bi destê xwurt
li ber çavên hemûya Îsraêlê karên
bihêz, yê mezin û tirsehêz kirin[2].

1 Bicû, bipelçiqînî, an jî: Bieciqînî.
2 An jî: Daye xuya kirin.

# YÊŞÛ

*Pêşgotin*

Ev pirtûk, dîroka bi dest ve xistina axên Kenanê, yên ku Îsraêlî di bin serokantiya Yêşûyê li dêvila Mûsa bûye serokê gel de dinivîse. Di nav bûyerên girîng yên ku di pirtûkê de derbas dibin de; derbasbûna Çemê Urdunê; ketina Erîhayê, bi dest ve xistina bajarê Ayê û ji nû ve lêkirina peymanê, mirov dikare bijmêre.

Di pirtûkê de ayeta herî tête zanîn jî 24:15 ye. Yêşû di vê ayetê de wusa dibêje: Û ger di çavê we de ji XUDAN re qûlitî kirin ne çê be, ka hûn ê ji îlahên ku bapîrên we li çemê Feratê wê de qûlitiyê jê re dikirin, an jî ji îlahên Amoriyên ku hûn di erdên wan de dijîn re qûlitiyê bikin, îro qirara xwe bidin. Lê belê ez û maliyên xwe, em ê ji XUDAN re qûlitiyê bikin!

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-12:24 | Bi dest ve xistina erdên Kenanê |
| 13:1-21:45 | Parvekirina erdan |
| a. 13:1-33 | Erdên li rojhilata çemê Urdunê |
| b. 14:1-19:51 | Erdên li rojavaya çemê Urdunê |
| c. 20:1-9 | Bajarên Stargeh |
| ç. 21:1-45 | Bajarên ku ji Lêwiyiyan re hatine cuda kirin |
| 22:1-34 | Eşîrên li rojhilatê bi cîh bûne vedigerin ser erdên xwe |
| 23:1-16 | Axaftina Yêşû ya xatirxwestinê |
| 24:1-33 | Peyman li Şekemê tête nûkirin |

*Ji Yêşû re Emrê Xudan*

5.Mûs 31,1-8; 14.23; 34.9

1 Û wusa bû ku, paşî mirina qûlê
XUDAN Mûsa, XUDAN bi
vî awayî bangî xizmetkarê Mûsa,
Yêşûyê lawê Nûn kir û got: 2 Qûlê
min Mûsa mir û niha rabe, tevî
hemûya gel Çemê Urdunê derbas
bibe. Bikevin welatê ku ez ê bi-

dim we, lawên Îsraêl! 3 Mîna ku ji
Mûsa re gotibûm, her derê ku hûn
pêlê xwe bavêjinê, ez didim we.
4 Dê axên we, ji çolê, heta Lub-
nanê, ji çemê Ferata mezin ve, bi
tevî hemûya welatê Hîtîtê, dirêjî
heta behra mezin ya ku li rojhilatê
ye dirêj bibin. 5 Dê di hemûya ji-
yana te de, kes li dijî te nesekine; ez
çawa bi Mûsa re bûm, ez ê bi te re jî
bim. Ez te tu carî berhewa[1] derna-
xînim û tu carî te bernadim!
6 Xwurt be û dilawêr[2] be! Ji ber
ku tuyê vî gelî bibe mêras stendina
welatê ku, bona dayîna wê min soz
dabû bapîrên wan. 7 Lê tu xwurt be
û dilawêr be. Bona bicîh anîna tû-
miya Zagona Pîroz, ya ku qûlê min
Mûsa emir dabû te, miqate bibe.
Bona ku tu li her derê ku tuyê biçê
serfiraz bibî, ji Zagonê ve neqete,
bi çep û rast ve çewt nebe! 8 Dê ev
kitêba Zagonê ji devê te ve neqete
û bona tu bala xwe bide ku li gor
wê bike, tuyê bi şev û roj wê bifi-
kire, ji ber ku, wê gavê tuyê rêya
xwe veke û serfiraz bibe! 9 Ma min
ji te re; xwurt be û dilawêr be ne-
got? Metirse û bêzar nebe! Ji ber ku
Xwedayê te XUDAN, di her derê
ku tu biçî de, dê bi te re be!

*Yêşû Emir dide Gel*

10 Û li ser vêya, Yêşû bi vî awayî
ji wezîfedarên gel re emir da û
got: 11 Ji nava artêşgehê ve derbas
bibin û vî emrî bidin gel û bêjin:
Ji xwe re zewêdê amade bikin. Ji
ber, bona hûn bi milkî welatê ku
Xwedayê we XUDAN bide we
bistînin, piştî sê rojê din vê Çemê
Urdunê derbas bibin!
12 Yêşû ji eşîrên Rûben û Gad
û ji nêviya eşîra Manaşşe re ûsa
got: 13 Di bîra xwe de bînin ku
qûlê XUDAN Mûsa: Dê Xwe-
dayê we XUDAN vî welatî bi we
de û we bigehîne aramiyê gotibû.
14 Bila pîrekên we, zarokên we,
heywanên we, li rojhilata Çemê
Urdunê, li axa ku Mûsa dabû
we bimînin. Lê belê hûn, hemû
şervanên egît, bi çekdarî berî bi-
rayên xwe çemê derbas bibin û
alîkariyê bi wan re bikin. 15 Mîna
ku XUDAN we gîhandiye reheti-
yê, dê birayên we jî bigihîne rehe-
tiyê. Paşî ew jî welatê ku XUDAN
bide wan ji xwe re bikin milk, hûn
jî vegerin zeviyên ku we ji xwe
re kirine milk, zeviyên li rojhilata
Çemê Urdunê, yên ku Mûsayê
qûlê XUDAN dayiye we û li wir
bi cîh bibin!
16 Û wan bi gotina: Te çi emir dabe
me, em ê wê bikin bersivê dan
Yêşû: Tu me bişînî ku, em ê biçin
wir! 17 Çawa ku di her awahiyê
de me gotina Mûsa guhdarî kirine,
em ê gotina te jî guhdarî bikin; lê

[1] Vala.

[2] Wêrek, cesûr.

bila Xwedayê te XUDANê ku bi
Mûsa re bû, bi te re jî be! 18 Yê
ku gotina te guhdarî neke, li gor
emirên te neke û li dijî wan rabe,
dê bi mirinê ve bê ceza kirin. Bes
e ku tu xwurt be û dilawêr be!

*Rehab û Sîxûran*

Îbr 11,31; Cihû 2,25; Yêşû 6,17.22-25

2 Û Yêşûyê lawê Nûn, ji Şîtîmê
ve bi dizîka du sîxûrî[1] şandin.
Herin lêkolînê li welêt, bi taybetî
jî li Erîhayê bikin, got. Û bi vî·
awayî sîxûrên ku derketin rê, çûn
mala fahîşeyek bi navê Rehab û
şevê li wir buhartin.
2 Û di vê navberê de, bi gotina:
Bona ku lêkolînê li welatê me
bikin, îşev ji gelê Îsraêlê zilaman
hatin vir nûçeyê ji qiralê Erîhayê
re gîhandin. 3 Li ser vêya qiralê
Erîhayê bi gotina: Zilamên ku ha-
tine cem te û li mala te dimînin
derxîne derve, nûçeyekê ji Rehab
re şand: Ji ber, ew bona ku lê-
kolînê li welatê me bikin hatine!
4 Û pîrekê her du zilaman rahişt û
wan veşart û got: Belê, hatina zila-
man ya cem min rast e. Lê belê min
nizanîbû ku, ka ji ku derê ne. 5 Çawa
ku tarî daketdaneket, deriyên bajêr
li ber girtinêbûn derketin. Ez niza-
nim çûne ku derê. Hûn hema li pêy
wan biçin, hûn ê bigihêjin wan! 6 Di
rastiyê de, pîrekê wan derxistîbû ser
xanî û di bin laskên kitana yên ku
li wir raxistibû, wan veşartibû. 7 Û
zilamên qiral jî, di tûmiya rêya ku
diçe bihurkên Çemê Urdunê de li
pêy sîxûran çûn[2]. Çawa ku ew ji ba-
jêr derketindemeketin, zendên derî
hatin kişandin.
8 Û berî ku zilamên li ser xanî ra-
kevin, pîrek derket cem wan. 9 Ez
dizanim ku XUDAN vî welatî daye
we got. Em ji ber we ketin toqînê; ji
tirsê, çongên her kesên ku li welêt
dijîn sist bûn. 10 Ji ber ku, gava
hûn ji Misirê ve derketin XUDAN
çawa Behra Gewez[3] li ber we ziwa
kir, we çi li her du qiralên Amorê
– Sîhon û Og – ku ji Çemê Urdunê
wê de ne, kirin, we çawa wan tune
kirin me bihîstin. 11 Û gava me
vana bihîstin, ji tirsê çongê me sist
bûn. Ji tirsa we, derman di kesekî
de nema. Ji ber ku Xwedayê we
XUDAN him li jor, li ezmanan,
him jî li jêr, li rûyê erdê Xwedanê
serwer e. 12 Û niha mîna ku min
qenciyê bi we re kiriye, hûn jî ji ke-
rema xwe bi navê XUDAN sondê
bidin ku hûn ê qenciyê ji malbata
min re bikin. 13 Bona ku hûn ê diya
min, bavê min, xwuşk û birayên
min û malbatên wan ji mirinê ve
xelas bikin û sax bihêlin, nîşanekî
ewlekar bidin min!

1 Cesûs.

2 Bera wan dan, an jî: Ew qewirandin.

3 Behra Gewez: Di Îbranîtî de Sûf, yanê Behra Qamir.

14 Û zilaman gotin: Ger hûn van
kirinên me eşkere nekin, em bona
ku li dêvla we bimirin amade ne.
Gava XUDAN vî welatî bide me,
em ê qenciyê bi te bikin û soza
xwe bigirin.
15 Wê çaxê wan bi bend ji şivakê
daxistin; ji ber ku mala wê di
birca bajêr de bû û pîrek di bir-
ca bajêr de rûdinişt. 16 Ji wan re
got: Derkevin çiyê, ya na dibe ku
hûn rastî yên li pêy we ketine bên.
Heta ku ew vegerin, sê rojê li wir
xwe veşêrin. Dawiyê hûn ê rêya
xwe bidomînin.
17 Û zilaman ji wê re gotin: Em
ê sonda ku te bi me daye xwarin
girtinê bigirin. 18 Lê belê gava
em bikevin welêt, vî tayê sor, bi
paca ku te me daxistiye ve girê
bide. Dayika xwe, bavê xwe, bi-
rayên xwe û hemûyên malbata
bavê xwe, li cem xwe, li mala
xwe bicivîne. 19 Û yê ku ji deriyê
mala te ve derkeve derve, dê bibe
berpirsiyarê xwîna xwe. Lê belê,
ji zirara ku were ji yekî li cem te,
di mala te de yî em berpirsiyar in.
20 Lê belê ger tu van kirinên me li
eşkeretiyê bixî, sonda ku te bi me
daye xwarin, me girê nade.
21 Û pîrek, bi gotina: Bila mîna
gotina we be! bersivê da. Û paşî
wan derxist ser rê û bi rê kir, tayê
sor bi şivakê ve girê da.
22 Û zilaman cuda bûn û derketin
çiyê, heta ku yên bi pêy wan ke-
tibûn vegeriyan, sê roj li wir man.
Û yên ku bi pêy wan ketibûn, her
çiqas di tûmiya rê de li wan geri-
yabin jî, nedîtin. 23 Û her du zi-
lam, li ser vegerê, ji çiyê daketin.
Çem derbas kirin û gîhaştin cem
Yêşûyê lawê Nûn û hemû tiştên
ji serê wan ve derbas bûne, ji wî
re gotin. 24 Û ji Yêşû re gotin: Bi
rastî jî XUDAN hemûya welat da
destê me û çongê hemû kesên li
wir dijîn jî sist bûn!

### *Îsraêlî Çemê Urdunê derbas dikin*

2.Mûs 14,15-31; 2.Qir 2,6-8.13-14;
Zeb 114,3.5

3 Yêşûyê ku sibehê zû rabû û tevî
hemûya lawên Îsraêl ji Şîtîmê
derketin rê û heta Çemê Urdunê
hatin. Û berî ku çem derbas bikin,
li wir qonax danîn. 2 Û wezîfe-
darên di dawiya roja sêwemîn de
ji serî heta dawî artêşgehê derbas
kirin, 3 emrê: Gava hûn bibînin
ku kahînên Lêwiyî Sindoqa Pey-
manê ya Xwedayê we XUDAN
hilgirtin, hûn jî ji cîhê xwe rabin
û li pêy Sindoqê herin, da gel.
4 Bi vî awayî, hûn ê bizanibin ku,
ka hûn ê herin kîjan alî. Ji ber ku
berê, hûn qet ji vê reya ve derbas
nebûne. Lê belê nêzîkî Sindoqa
Peymanê nebin; bila di nava we û
Sindoqê de navberek qasî du he-
zar gezî[1] bimîne.

*1* Du hezar gez: Nêzîkî 900 mîtro.

5 Û Yêşû ji gel re got: Xwe pîroz
bikin; ji ber ku XUDAN dê sibê di
nava we de mûcîzetan biafirîne.
6 Û Yêşû ji kahînan re got: Sin-
doqa Peymanê hilgirin û derbasî
pêşiya gel bibin.
Û bi vî awayî, kahînan Sindoqê
hilgirtin û di pêşiya gel de dest bi
meşê kirin.
7 Di vê navberê de, XUDAN ji
Yêşû re ûsa got: Bona ku fêhm
bikin, çawa ku ez bi Mûsa re bûm,
ez bi te re jî me, îro, ez ê dest pê
bikim û te di çavên hemû Îsraêli-
yan de bilind bikim. 8 Û emrê:
Gava hûn bigihêjin qeraxa Çemê
Urdunê bisekinin bide kahînên ku
Sindoqa Peymanê hilgirtine.
9 Û Yêşû, paşî ji lawên Îsraêl re
got: Nêzîk werin û gotinên Xwe-
dayê xwe XUDAN guhdarî bikin!
10 Û Yêşû got: Hûn ê ji vêya fêhm
bikin ku Xwedayê zindî di nava
we de ye û dê bi biryarî gelên
Kenanî û Hîtîtî û Hîvî û Perizî û
Girgaşî û Amorî û Yebûsî ji ber we
bajo. 11 A vay, Sindoqa Peymanê
ya ku aidî XUDANê ku xwediyê
hemûya rûyê erdê ye, dê berî we
têkeve Çemê Urdunê. 12 Û niha ji
her eşîrê kesekî, bi tûmî, ji eşîrên
Îsraêlê donzdeh merivî ji xwe
re hilbijêrin. 13 Û çawa lingên
kahînên ku Sindoqa Peymana XU-
DAN, Xudanê hemûya rûyê erdê
ye hilgirtine li Çemê Urdunê bike-
vinnekevin, avên ji jor ve diheri-
kin dê bên birîn û mîna komekî
bicivin.
14 Û wusa bû ku, gel ji cîhê ku
bona Çemê Urdunê derbas bibin
qonax dabû bi rê ve ket. Kahînên
ku Sindoqa Peymanê hilgirtine
ji pêşiyê ve diçûn. 15 Kahînên
ku Sindoqê dibirin, gava gîhaştin
qeraxa çem û lingê xwe avêtin avê
(Çemê Urdunê, dema zad çinandinê
radibe û qeraxên xwe digire),
16 avên ta ji jor ve tên sekinîn, ji
gelekî dûr ve li bajarê Adamê, yê
ku nêzîkî Saretanê yî mîna komekê
dest bi bilindbûnê kirin. Ûsa ku,
avên ku ber bi Gola Arabayê ve
diherikin gola Lût[1], bi tûmî hatin
birrîn. Û gel ji hemberî Erîhayê
ve çem derbas kirin. 17 Û kahînên
ku Sindoqa Peymanê ya XUDAN
dibin, heta ku gel bi tûmî çem
derbas bûn, di derava çem ya ziwa
bûyî de bê leqîn sekinîn. Û bi vî
awayî, hemû gelê Îsraêlê ji derava
çem ya ziwabûyî derbas bûn.

*Kevirê ku ji Çem ve hatine rahiştin*

4 Û paşî ku hemûyê gel ji Çemê
Urdunê ve derbas bûn, XU-
DAN bi vî awayî bangî Yêşû kir:
2 Ji bo xwe ji her eşîrê zilamekî,
donzdeh zilamî ji nav gel ve hil-
bijêrin. 3 Vê emrê bide wan: Ji
vir, ji nava Çemê Urdunê, ji cîhê
ku kahînan lingên xwe bi zexmî

[1] Gola Xwê.

danîne donzdeh kevirî rahêlin.
Van keviran bi xwe re bibin û
deynin cîhê ku hûn ê vê şevê lê
biborînin.
4 Û bi vî awayî Yêşû, wekî ji her
eşîrê zilamek bibe, ji lawên Îsraêl
bangî donzdeh zilamên ku wî hil-
bijartîbûn kir. 5 Û Yêşû ji wan re
got: Herin nava çem, heta Sindoqa
Peymana Xwedayê we XUDAN
û li gor hejmara eşîrên lawên Îs-
raêl, bila her yek kevirekî hilgirê
ser milên xwe; 6 da ku, vana bona
we bibin nîşanek û gava zarokên
we, di dema werê de: Mana van
kevirana, bona we çi ye? bipirsin,
7 hûn ji wan re bibêjin ku: Avên
Çemê Urdunê, li ber Sindoqa
Peymana XUDAN ve hatin bir-
rîn. Dema Sindoqa Peymanê ji
çem ve derbas dibû, avên ku di-
herikîn sekinîn. Û ev kevirana, dê
heta bêdawîbûnê bona lawên Îs-
raêl bibin bîranîna vê bûyerê.
8 Û lawên Îsraêl emrê Yêşû anîn
cîh. Mîna ku XUDAN ji Yêşû re
gotiye, donzdeh kevirên ku ji nava
Çemê Urdunê rahiştibûn, birin
cîhê ku dê lê qonaxê bidin dan ser
hev. 9 Û wekî din jî Yêşû, li nava
Çemê Urdunê, li cîhê ku kahînên
Sindoqa Peymanê rahiştibûn se-
kinîne donzdeh kevir danî. Û ew
kevirana heta îro li wir in.
10 Û bi vî awayî, heta her tiştên ku
XUDAN, bona bigehîne gel emir
dabû Yêşû, anîn cîh, kahînên ku
Sindoqê hilgirtibûn di nava Çemê
Urdunê de sekinîn. Her tişt, mîna
ku Mûsa emir dabû Yêşû hatin çê-
kirin. Û gel jî bi lezî çemê derbas
kirin. 11 Û paşî ku hemûya gel
derbas bûn, kahînan tevî Sindoqa
Peymana XUDAN derbasî pêşiya
gel bûn. 12 Eşîrên Rûben, Gad û
nêviya eşîra Manaşşe, mîna ku
Mûsa emir dabû wan, bi çekdarî
ketin pêşiya lawên Îsraêl. 13 Bi vî
awayî, qasî çel hezar kesên bi çek,
bona ku şer bikin, li ber XUDAN
ketin deştên Erîhayê.
14 XUDAN wê rojê, Yêşû li ber
çavê hemûya gelê Îsraêl bilind
kir. Û çawa ku di tûmiya jiyana
Mûsa de hurmetê ji wî re kiribin,
dest pê kirin û wusa hurmetê ji
Yêşû re jî kirin.
15 XUDAN ji Yêşû re got:
16 Destûrê bide ku bila kahînên
ku Sindoqa Peymanê dikişînin ji
Çemê Urdunê ve derkevin.
17 Yêşû jî emrê: Ji Çemê Urdunê
ve derkevin, da kahînan.
18 Û wusa bû ku, dema kahînên
Sindoqa Peymana XUDAN
dikişînin, çawa ku ji nava Çemê
Urdunê ve derketin û binya lingên
kahînan pê li cîhê ziwa kirin, avên
Urdunê vegeriyan cihê xwe û dîsa
mîna berê, bi xuroş bûna hemû
rexên xwe herikîn.
19 Û gel, di roja dehemîn ya meha
yekem de Çemê Urdunê derbas
kirin û li Gîlgalê, li sînora roj-

hilat ya Erîhayê de qonax danîn. 20 Û Yêşû donzdeh kevirên ku ji çem ve hatine rahiştin, li Gîlgalê çikandin[1]. 21 Û dawiyê, ji lawên Îsraêl re wusa got: Ger rojekê zarokên we, bi gotina: Mana van kevirana çi ye? ji we bipirsin, 22 hûn ê ji wan re: Gelê Îsraêlê, ji derava ziwa ya Çemê Urdunê ve derbas bûn bibêjin. 23 Ji ber ku Xwedayê we XUDAN çawa di dema derbasbûnê de, Behra Gewez[2] li ber me ziwa kiribe, Çemê Urdunê jî di dema derbasbûna we de li ber we ziwa kir. 24 Ûsa ku, bila hemûya gelên rûyê erdê fêhm bikin ku XUDAN çiqas xwurt e û hûn jî tim ji Xwedayê xwe XUDAN bitirsin!

5 Û qiralên Amorî yên ku li aliyê bakûr in û qiralên Kenanî yên ku li qeraxa behrê ne, gava bihîstin ku XUDAN avên Çemê Urdunê li ber lawên Îsraêl, di derbasîbûna gel de çawa ziwa kiriye, ji ber lawên Îsraêl, ketin derd û kula canên xwe; ji tirsê çongên wan sist bûn.

*Li Gîlgalê Bûyera Sunetê*

1.Mûs 17,9-14.23-27; Kol 2,11-12

2 Di vê navberê de, XUDAN bi vî awayî bangî Yêşû kir: Ji xwe re, ji keviran kêran çêke û mîna berê[3] lawên Îsraêl dîsa sunet bike! 3 Û bi vî awayî Yêşû bi kêrên ku ji keviran çêkiribû, li Gîbeat-Haaralotê lawên Îsraêl sunet kirin. 4 Û sedema vê kirina wî ev bû: Gava ku gel ji Misirê ve derketin, hemû zilamên di temena şerkirinê de ne, paşî ji Misirê ve derketibûn, di dema derbaskirina çolê de miribûn. 5 Hemû zilamên ku ji Misirê ve derketibûn, bi sunet bûn. Lê belê yek jî ji zilamên ku paşî derketina ji Misirê di rê de, di çolê de welidîne sunet nebûbûn. 6 Ji ber ku, heta hemûyê gel, zilamên cengê yên ji Misirê derketine biqedin, lawên Îsraêl çel sal di çolê de meşiyan. Ji ber ku guh nedabûn gotina XUDAN. XUDAN, bona welatê ku şîr û hungiv jê diherike, ya bona bide me, soz dayiye bapîrê me, nîşanî wan nede, sond xwaribû. 7 XUDAN, dêvla wan, zarokên wan da jiyîn. Yêşû van zarokên ku bê sunet in, sunet kir. Ji ber ku di rê de sunet nebûbûn. 8 Paşî sunetbûna hemûya zilaman, heta ku birînên wan baş bibin, li artêşgehê man. 9 Û XUDAN ji Yêşû re got: Min şermezariya ku hûn li Misirê şermezar bûbûn îro ji ser we ve rakir. Û sedema heta îro navê Gîlgalê[4] dana wir ev yek e.

---

[1] Bi cîh kir (danî).
[2] Binihêrin 2:10
[3] An jî: Cara duwemîn.
[4] Gilgal: Bi Îbranîtî Galal, yanê ji fiêla rakirin, gindirîn hatiye afirandin.

*Cejna Fisihê*

*Fermandarê Artêşa Xudan*

2.Mûs 12,1-28; 4.Mûs 9,1-14

10 Û lawên Îsraêl, yê li Gîlgalê, di deştên Erîhayê de qonax danîne, êvara çardehan ya mehê, Cejna Fisihê pîroz kirin. 11 Roja paşî Fisihê, tam di wê rojê de, ji zadê welat ve nanê bêhavên çêkirin û similên hatine qemirandin xwarin. 12 Û gava manna hate birîn, lawên Îsraêl wê salê bi zadê zeviyên Kenanê ve xwe xwedî kirin.

13 Û Yêşû nêzîkî Erîhayê bû. Gava serê xwe hilda, li ber xwe, zilamek şûrê xwe kişandiye dît. Nêzîkî wî bû û pirsa: Ma tu ji me yî an jî ji aliyê dijminê me yî? ji wî pirsî.

14 Û zilam got: Ne yek jî. Ez fermandarê artêşa XUDAN im. Niha hatim.

Wê gavê Yêşû bi ser dev xwe avêt erdê û bi wî peristî. Bi gotina: Destûra efendiyê min ji qûlê wî re çi ye? ji wî pirsî. 15 Fermandarê artêşa XUDAN got: Pêlava xwe ji lingê xwe ve derxîne. Ji ber, cîhê ku tu pêlê dikî, pîroz e! Û Yêşû, ya ku hatiye gotin kir.

*Têkçûna Erîhayê*

Îbr 11,30: 5.Mûs 7,16.24-26; 20,16-18

6 Û deriyên bajarê Erîhayê, ji ber lawên Îsraêl bi zexmî hatibûn girtin. Ne yê dikeve hebû û ne jî yê derdikeve. 2 Û XUDAN ji Yêşû re got: A vay, ez Erîhayê, qiralê wê û şervanên wê yî egît didim destên te. 3 Hûn, yên şervan,
dora bajêr di rojê de carekê, şeş
rojî bizivirin. 4 Û heft kahînên ku boriyên ji qiloçê beranan rahiştine, bila ji ber Sindoqê ve herin. Û roja heftemîn, heft carî li dora bajêr bigerin; di vê navberê de, bila kahîn li boriyên xwe bixin.
5 Û gava hûn, bi dûdirêjî lêxistina kahînan ya boriyên ji qiloçên beranan bibhîzin, bila hemûya gel, bi dengekî bilind biqêre. Û wê gavê dê dîwarên bajêr xera bibin û her kes ji cîhê ku sekinîne, rasterast têkevin bajêr!
6 Û Yêşûyê lawê Nûn bangî kahînan kir û got: Sindoqa Peymanê ya XUDAN hilgirin. Bila heft kahîn, di dest wan de bi boriyên ji qiloçên beranan, di pêşiya Sindoqê de bimeşin! 7 Û dawiyê ji gel re got: Rabin û dest bi gera li dora bajêr bikin. Bila pêşengên bi çek, di pêşiya Sindoqa XUDAN de biçin!
8 Û wusa bû ku, gava Yêşû vana ji netewê re got; heft kahînên ku ji qiloçê beranan heft boriyan rahiştine, bi lêxistina boriyên xwe, ji ber XUDAN derbas bûn.
Û Sindoqa Peymana XUDAN li pêy wan diçû. 9 Û pêşengên bi çek, ji ber kahînên ku li boriyê dixin, paşber jî li pêy Sindoqê pêş ve diçûn, di vê navberê de

borî dihatin lêxistin. 10 Û Yêşû,
vî emrê da gel û got: Halanên
şer neavêjin, dengê xwe bilind
mekin. Heta roja ku ez bibêjim:
Biqêrin, bila gotinek jî ji devê we
dernekeve! Gava we emrê min
bihîstin, biqêrin. 11 Û gel tevî
Sindoqa XUDAN, carekê dora
bajêr geriya, dawiyê vegeriyan
artêşgehê û şevê li wir buhartin.
12 Û roja din, Yêşû zû rabû. Û
kahînan jî Sindoqa XUDAN hil-
girtin 13 û heft kahînên ku ji qi-
loçê beranan boriyan rahiştine ji
ber Sindoqa XUDAN bêsekin pêş
ve diçûn û li boriyên xwe dixistin.
Pêşengên bi çek, ji ber wan diçûn,
paşber jî li pêy Sindoqa XUDAN
ve diçûn. Û di vê navberê de borî
bêsekin dihatin lêxistin. 14 Û bi
vî awayî, roja duwemîn, carek li
dora bajêr geriyan û vegeriyan
artêşgehê, şeş rojî wusa kirin.
15 Û roja heftan, sibehê zû hîn
berbang diavêt, rabûn û mîna
her gavî heft carî li dora bajêr
geriyan. Tenê wê rojê heft carî li
dora bajêr geriyan. 16 Û gava di
dora heftemîn de, kahînan li bo-
riyê xwe xistin, Yêşû ji gel re:
Biqêrin! XUDAN bajêr da we!
got. 17 Û: Bajar, tevî her tiştên di
hundirê wê de yî, ji XUDAN re
hatiye qewil kirin[1]. Tenê Fahîşe
Rehaba ku şandiyê me veşartiye
û maliyên wê dê sax bên hiştin.
18 Lê belê hûn xwe ji tiştên hati-
ne qewil kirin biparêzin. Ger hûn,
tiştên ku we qewil kirine bigirin,
hûn ê artêşgeha Îsraêl bibin bêtar
û têkçûnê. 19 Hemûya zêr, zîv
û pertalên[2] hesin û tûncî, ji XU-
DAN re hatine cihê kirin. Dê vana
bikevin xezîna XUDAN.
20 Û gel dest bi qêrînê kir û kahîn-
an jî li boriyê xwe xistin. Û gelê
ku dengê boriyê bihîstin, hîn jî bi
dengekî bilind qêriyan. Dîwarên
keleha bajêr xera bûn. Û her kes
ji cîhê ku lê ye, rasterast ketin
bajêr. Û bi vî awayî, bajêr bi dest
ve xistin. 21 Û pîrek, zilam, xort
û kalepîr, ji heywanên serî biçûk
û serî mezin, heta keran li bajêr
çiqas zindî[3] hebin, hemû ji şûr ve
derbas kirin û tune kirin.
22 Û Yêşû ji her du zilamên ku bi
sîxûrî şandibû welat re got: Herin
mala wê fahîşê, mîna ku we sond
dayiye, pîrekê û hemû merivên wê
derxînin derve. 23 Sîxûrên ciwan,
yên ku ketibûn malê, Rehab, diya
wê, bavê wê û tevî birayên wê yî
mêr, hemû merivên wê û her tiştên
aidî wê rahiştin û anîn nêzîkî
artêşgeha Îsraêlê. 24 Û dawiyê

[1] Ji XUDAN re hatiye qewil kirin: Di Îbranîtî de, kiryara heram bona mirov an jî pertalên ku ji XUDAN re hatine qewil kirin dihat bi kar anîn. Tiştên ku hatibûn qewil kirin, li gor rewşê dibû ku bê tune kirin.

[2] Yanê alav.

[3] Candar, yan jî: Yên bican.

agir bi bajêr, tevî yên ku di hun-
dirê wê de xistin. Lê zêr û zîv, per-
talên tûnc û hesin xistin xezîneya
Perestgeha XUDAN. 25 Yêşû
dest neda Rehaba Fahîşe, maliyên
bavê wê û merivên wê. Rehaba
şandiyên ku Yêşû, bona lêkolînê li
Erîhayê bikin şandibû veşart, heta
îro jî di nava Îsraêliyan de dijî.
26 Û paşî vêya, Yêşû bi vî awayî
sondê xwar: Yê ku ji nû ve bixwa-
ze vî bajarî, Erîhayê ava bike, bila
rastî naleta XUDAN were! Yê ku
xwe li vêya rakişîne, dê di berdê-
la lawê xwe yî mezin de bingehê
bavêje, di berdêla lawê xwe yî herî
biçûk de jî deriyan têxe cîhê wan!
27 Û XUDAN bi Yêşû re bû. Nav û
dengê Yêşû, gîhaşt her derê welêt.

*Gunehê Akan*

Yêşû 22,20; 5.Mûs 7,25-26

7 Û çi heye ku, lawên Îsraêl,
emrê di derheqê pertalên ku
ji XUDAN re hatine qewil kirin
de guhdarî nekirin. Dema Akanê
lawê Karmî, yê lawê Zavdî, yê
lawê Zerahê ji eşîra Cihûda yî,
hinek ji pertalên ku hatine qewil
kirin rahişt, XUDAN li dijî lawên
Îsraêl hêrs bû.
2 Û Yêşû, ji bajarê Erîhayê zilaman
şand bajarê Ayê, ya ku li rojhilata
Beytelê û nêzîkî Beyt-Avenê ye û
got: Herin, lêkolînê li bajêr bikin.
Û zilaman jî çûn û lêkolînê li ba-
jarê Ayê kirin. 3 Û dawiyê vegeri-
yan cem Yêşû û jê re gotin: Hewce
nîne ku hemû gel here wir û biwes-
te. Bona bindest kirina gelê bajarê
Ayê ya ku hejmara wan kêm e,
du hezar an jî sê hezar kes bes e.
4 Qasî sê hezar Îsraêliyên ku bi ser
bajêr ve meşiyan, dest pê kirin û ji
ber gelê Ayê reviyan. 5 Û gelê Ayê,
ji wan, qasî sîh û şeş kesî kuştin, ji
deriyê bajêr, heta Şevarînê jî berra
pêy yên sax mane dan. Yên ji hev-
razê ber bi jêr ve dadiketin, hatin
kuştin. Ji tirsê dilê wan heliya û bû
mîna avê.
6 Û li ser vêya Yêşû kincên xwe
çirand û tevî pêşhatiyên Îsraêliyan,
axê ji serê xwe ve berjêr rijand û li
ber Sindoqa XUDAN, bi ser devî
çû erdê û heta êvarî di vî halî de
ma. 7 Û Yêşû got: Ax! Ya Xudan,
XUDAN! ma te bona ku me
bidî destê Amoriyan û tune bikî,
ji Çemê Urdunê ve derbas kir?
Xwezîka em bi halê xwe ve razî
bibûna û li aliyê dinî çem bimana!
8 Ax, ya Xudan, ma paşî gelê
Îsraêlê vegere û ji ber neyarên xwe
ve bireve, ez dikarim çi bibêjim?
9 Û Kenanî û gelên din yên ku li
welat ve dijîn, gava vêya bibihîzin
dê dora me bigirin, navê me ji rûyê
erdê ve paqij bikin. Û tuyê bona
navê xwe yî mezin çi bikî?
10 XUDAN bi vî awayî bersivê
da Yêşû: Rabe ser pêlan! Tu çima
ûsa bi ser devî xwe davêje erdê?
11 Îsraêl gunehê kir. Peymana ku

bi wan re kirime û bona ku bînin
cîh emir dame xera kirin. Û hinek
ji pertalên ku hatine qewil kirin di-
zîn, xistin nav pertalên xwe û de-
rew kirin! 12 A vay, bona vê yekê
lawên Îsraêl nikarin li ber neyarên
xwe bisekinin, piştên xwe dizîvi-
rin û ji ber neyarên xwe direvin.
Ji ber ku li wan hate nalet lêkirin.
Ger hûn pertalên hatine qewil ki-
rin, yên ku bi we re yî tune nekin,
êdî ez ê bi we re nebim! 13 Rabe,
gel pîroz bike û ji wan re bibêje ku:
Xwe bona sibê pîroz bikin. Ji ber
ku Xwedayê Îsraêl XUDAN wusa
dibêje: Ya Îsraêl, we hinek ji per-
talên ku hatine qewil kirin rahiştin.
Heta ku hûn vana tune nekin, hûn
ê nikaribin li ber neyarên xwe di
ber xwe de bidin! 14 Û gava bibe
sibeh, hûn ê eşîr bi eşîr rêz bibin
û bi dorê derkevin pêşiyê eşîra ku
XUDAN wan daye nîşan kirin, dê
ezbet bi ezbet derkevin pêşiyê. Ez-
beta ku XUDAN wan daye nîşan
kirin[1], dê malbat bi malbat derke-
vin pêşiyê. Dîsa mêrên malbata ku
XUDAN nîşan daye, dê yek û yek
derkevin pêşiyê. 15 Û kesê hatiye
girtin ku pertalên hatine qewil kirin
rahiştiye, tevî her tiştên aidî wî ne,
dê bi nava agir ve bêne avêtin. Ji
ber ku Peymana XUDAN xera kir
û li Îsraêlê gunehek erjeng kir.
16 Û Yêşûyê ku sibehê zû rabû,
gelê Îsraêlê, li gor eşîrên wê nê-
ziktir kir û eşîra Cihûda hate gir-
tin; 17 û eşîrên Cihûda nêziktir
anî û bi eşîra Zerah ve girt û eşira
Zerahiyan, li gor zilaman nêziktir
kir û bi Zavdî ve hate girtin; 18 û
malbata wî, li gor zilaman nêziktir
kir û Akanê lawê Karmiyê, lawê
Zavdiyê, lawê Zerahê ku ji ezbeta
Cihûda yî hate girtin.
19 Û wê gavê, Yêşû ji Akan re
got: Lawê min, Xwedayê Îsraêlê
XUDAN bilindtir bike, ji wî re
eşkere bike. Te çi kir, ji min re bi-
bêje, ji min veneşêre!
20 Û Akan, bi gotina: Rast e bersi-
vê da; min li dijî Xwedayê Îsraêlê
XUDAN ve gunehê kir. Û kirina
min ev e: 21 Gava di nava xenî-
metê de qeftanek xweşik, karê
Babîlê, du sed şekel[2] zîv û zêrekî
di giraniya pêncî şekelî[3] de yî
dîtim, bi xwe negirtim û rahiştim.
Di herî binî de zîvan, min giştikî
li axa ku di nava çadira min de yî
binerd kirin.
22 Û zilamên ku ji aliyê Yêşû ve ha-
tibûn wezîfedar kirin, hema baz dan
çadirê. Û pertalên ku hatine binerd
kirin, li wir dîtin. Û zîv di herî binî
de bû. 23 Û giştikî ji çadirê derxis-
tin. Anîn cem Yêşû û lawên Îsraêl û
li ber XUDAN li erdê raxistin.

---

1 Yanê yê ku bi peşkê ve nîşan daye.
2 Du sed şekel: Nêzîkî 2,3 kîlo.
3 Pêncî şekel: Nêzîkî 580 gram.

24 Yêşû û gelê Îsraêl, Akanê lawê
Zerah, zîvî, silopê zêrînî, qeftanê,
law û qîzên Akan, heywanên wî
yên serî çûk û serî mezin û kerê
wî, tevî çadira wî hemû pertalên
wî rahiştin û birin newala Akorê[1].
25 Û Yêşû ji Akan re got: Ma te
me çima ber bi bêtarê ve bir? XUDAN
jî dê îro, te rastî bêtarê bibe.
Li pêy vê yekê hemûya gelê Îsraêl,
Akan dan ber keviran[2]. Û her
çi yên aidî wî hebin, dan ber keviran
û şewitandin. 26 Û li ser Akan,
ji keviran komek mezin çê kirin.
Ev koma heta îro jî disekine. Û
li ser vêya, hêrsa XUDAN aş bû.
Sedema wir ku heta niha bi navê
Newala Akorê di bîr tê, ev e.

*Têkbirina Bajarê Ayê*

5.Mûs 21,22-23

8 XUDAN ji Yêşû re got: Metirse,
bêzar nebe! Hemû
şervanên xwe bigire cem xwe
û li ser bajarê Ayê ve bimeşe. A
vay, qiralê Ayê, gelê wê û bajêr,
tevî hemû axên wê dam destên te
2 û tuyê ji Ayê û ji qiralê wê re,
mîna ku te li Erîhayê û li qiralê
wê kiriye bikî, lê hûnê talana mal
û heywanên wê ji xwe re rakin. Li
dijî bajêr, li pişta wê ve kemînê
deyne!
3 Bi vî awayî, Yêşû tevî hemû
şervanên xwe, bona ku li ser bajarê
Ayê ve bimeşe, xwe amade kir. Û
Yêşû sîh hezar şervanên egît bijart
û wan bi şev şand û 4 bi vî awayî
emir da wan: Herin, li paşê bajêr,
têkevin kemînê. Ji bajêr ve zêde
dûr nesekinin. Hûn gişt, her tim
amade bin. 5 Û ez ê tevî gelê ku li
cem min in, nêzîkî bajêr bibim. Û
mîna cara din, gava neyar ji bajêr
ve derkeve û bi ser me ve were, ez
ê wekî ji ber wan direvim bikim 6 û
heta ku wan ji bajêr ve dûr bixin, li
pêy xwe biherikînin. Ew ê bibêjin
qey mîna cara din em ji wan direvin!
Gava em wekî direvin bikin,
7 hûn jî ji cîhê ku we kemînê lê
danîbûn derkevin û bajêr bi dest ve
bixin. Dê Xwedayê we XUDAN
wir bide destên we. 8 Û gava we
bajar bi destê xwe ve xistin, agir pê
bixin. Li gor emrê XUDAN bikin.
A vay, emrê min ev e!
9 Û li pêy, Yêşû wan bi rê kir. Zilaman
çûn û di nava Beytel û bajarê
Ayê de, li rojava bajarê Ayê
kemîn avêtin. Yêşû jî şevê bi gel
re buhart.
10 Û Yêşû, sibehê zû rabû û gel
civand. Dawiyê li pêşiyê ew û
pêşhatiyên Îsraêlê, ber bi bajarê
Ayê ve bi rê ketin. 11 Û tevî hemû
şervanên pê re, bi ser bajêr ve
meşiya. Nêzîk hatin û li bakurê
Ayê ve artêşgehê danîn. Û di navbera
wî û Ayê de newalek hebû.

1 Akor: Bêtar, felaket.

2 Recimandin.

12 Û wî qasî pênc hezar zilamî
rahiştin û wan di nava Beytel û
Ayê de, li rojavayê bajêr de xistin
kemînê. 13 Û li pêy, him yên li
bakur artêşgehê danîne û him yên
li rojavayê ketine kemînê, ketin
sazûmana şer. Û Yêşû, wê şevê di
newalê de pêş ve çû.
14 Û qiralê Ayê, yê ku vêya dît,
tevî gelê bajêr sibehê zû rabû.
Bêyî wext buhartin, bona ku bi
Îsraêliyan re şer bike, derket cîhê
hatiye diyar kirin, yê ku li hem-
berî herêma Aravê ye. Çi heye
ku, ji kemîna ku li paşê bajêr ve,
bona wî hatiye avêtin, bê hay
bû. 15 Û Yêşû û hemûya Îsraêli-
yên ku li cem wî ne, mîna li ber
gelê bajêr, rastî xerabûnê hatibin
ber bi çolê ve dest bi revê kirin.
16 Hemû gelê li bajêr, bona ku
berra Îsraêliyan bidin, hatin bang
kirin. Lê belê gava berra Yêşû di-
dan, ji bajêr ve bi dûr ketin. 17 Û li
Ayê û Beytelê yek kesek nema bû
ku, bona berra Îsraêliyan bide der-
neketiye. Gava bi pêy Îsraêliyan
ketin, deriyên bajêr vekirî hiştin.
18 Û XUDAN ji Yêşû re got: Rima
di destê xwe de, ber bi bajarê Ayê
ve dirêj bike; ez wir didim destên
te. Û Yêşû, rima ku di destê xwe
de ye, ber bi bajêr ve dirêj kir.
19 Û çawa ku destê xwe dirêj kirne-
kir, yên di kemînê de ne, ji cîhê xwe
ve hol bûn û ketin bajêr; bajêr bi
dest ve xistin û hema agir pê xistin.
20 Û gava zilamên Ayê bajarî zi-
virîn û li paş xwe nihêrtin, duhên
ji bajarê dişewite bilind dibe dîtin.
Gava Îsraêliyên ku ber bi çolê ve
direvin vegeriyan û êrîşî wan ki-
rin, êdî tu cîh û hêza wan nemabû
ku ew birevin. 21 Yêşû û hemûya
Îsraêliyên li cem wi, gava dîtin ku
yên ketibûn kemînê bajêr bi dest
ve xistine û ji bajêr ve duh bilind
dibe, vegeriyan û êrîşî gelê Ayê
kirin. 22 Dema yên ku bajar bi
dest ve xistine jî derketin û beşdarî
êrîşê bûn, gelê bajêr di nava Îs-
raêliyên ku ji her du aliyî ve tên
de man. Û Îsraêliyan, heta ku yekî
zindî nehêlin, giştikî kuştin. 23 Û
qiralê Ayê, yê ku bi zindî hêsîr ki-
ribûn, derxistin ber Yêşû.
24 Û paşî Îsraêlî ji bajêr ve der-
ketin û yên ku di çol û beyaran de
berra wan dane bi şûran ve kûştin,
vegeriyan bajêr û yên ji ber mayî
jî ji şûran ve derbas kirin. 25 Wê
rojê, hemûya gelê Ayê hatin kuştin.
Giştika yên ku hatibûn kuştin, jin
û mêr, donzdeh hezar kes bûn.
26 Û Yêşû, heta hemûyên li ba-
jêr ve dijîn nehatin kuştin, destê
xwe yî bi rimê ve girtiye danexist.
27 Lê Îsraêliyan, li gor emrê ku
XUDAN daye Yêşû, mal û hey-
wanên bajêr talan kirin.
28 Û li pêy, Yêşû agir bi bajarê
Ayê ve xist, şewitand, xera kir û
vergerand wêranê. Xerabeyên wê,
heta îro jî disekinin. 29 Û Yêşûyê

ku qiralê Ayê bi dar ve daliqand û
heta êvarê li wir hişt, dema roj diçû
ava termê wî ji darê ve da daxistin û
avêtin derveyî deriyê bajêr. Û li ser
term, ji keviran komekî mezin çêki-
rin. Ew koma, heta îro jî disekine.

*Zagona Pîroz ji Gel re tête xwendin*

30 Ji vêya pê ve, Yêşû li çiyayê
Ebalê ji Xwedayê Îsraêl XUDAN
re, pêşkêşîgehekê ava kir. 31
Pêşkêşîgeh, li gor emrê Mûsayê
qûlê XUDAN, mîna ku di Pir-
tûka Zagonê ya Mûsa de hatiye
nivîsandin, ji kevirên ku nehatine
teraş kirin, haletê hesin lê neke-
tiye ve hate çêkirin. Û li wir, ji
XUDAN re qewlên şewitandinê
pêşkêş kirin, qurbanên dilxweşiyê
şerjêkirin. 32 Û Yêşû, sûretek
Zagona Pîroz, ya ku Mûsa li ber
gelê Îsraêlê ve nivîsandî ye, li
lewhayên kevirî ve nivîsand. 33
Û hemûya Îsraêliyan, bi pêşhatî
serwer û wezîfedarên xwe, tevî
biyanan, li her du aliyê Sindoqa
Peymana XUDAN, wecê wan
ber bi kahînên Lêwiyî, yên ku
Sindoqê hilgirtine zivirî, rêz bûn.
Nêviyê gel, pişta xwe dan çiyayê
Gerizîmê, nêviyê din jî da çiyayê
Ebalê. Ji ber ku Mûsayê qûlê XU-
DAN, ji berê ve emir dabû ku,
bona bên pîroz kirin, divê wusa
bisekiniyan. 34 Û li pêy, Yêşû
hemûya Zagonê, beşên di der-
heqê pîroz û nalet kirinê de, mîna
di Pirtûka Zagona Pîroz de hatiye
nivîsandin xwend. 35 Bi vî awayî,
gotinek ji emirên Mûsa nema ku
Yêşû ji hemûya civaka Îsraêli-
yan re ya ku di nav wê de tevî
biyanan, pîrek û zarokan jî hene,
nexwendibe.

*Fenekiya Gîboniyan*

Yêşû 11,16-20; 2.Sam 21,1-14

9 Û gava hemû qiralên Hîtît,
Amor, Kenan, Periz, Hîv û
Yebûsê, yên ku ji Çemê Urdunê
wê de, li herêma çiyayî, li Şefela
û li qeraxa behra mezin yê ku heta
Lubnanê dirêj dibe ne, tiştên bûne
û qediyane bihîstin; 2 bona li dijî
Yêşû û gelê Îsraêlê şer bikin, hatin
cem hev. 3 Lê belê gelê Gîbonê jî
gava tiştên ku Yêşû bi Erîhayê û
bajarê Ayê ve kiriye bihîstin, serî
dan fenekiyê.
4 Rewşa niwêneran dan xwe, cu-
herên peritî, meşkên kevn, çiri-
yayî û bi pîne yên xemrê li pişta
kerên xwe kirin. 5 Û di lingên
wan de pêlavên helisî û bi pîne,
li pişta wan jî kincên kevn û per-
tal hebûn. Nanê ku di kîsê wanî
zewade de ifnikbûyî û hişkbûyî
bûn. 6 Û zilaman çûn artêşgeha
li Gîlgalê, cem Yêşû. Ji wî û gelê
Îsraêl re gotin: Em ji welatekî dûr
ve hatin. Em dixwazin ku hûn bi
me re peymanekê aşitiyê çêkin.
7 Lê belê Îsraêlî bi gotina: Ma
çima em ê bi we re peymanê çê-

bikin? bersivê dan Gîboniyan[1]:
Dibe ku hûn nêzîkî me bijîn.
8 Û ji Yêşû re gotin: Em qûlên
te ne.
Û Yêşû bi gotina: Hûn kî ne? Ji ku
tên? pirsî.
9 Û ew jî: Em ji welatekî, gelek li
dûrayî rabûn û hatin gotin. Ji ber ku
me nav û dengê Xwedayê te XU-
DAN bihîstin. Nûçeyê di derheqê
wî de, her tiştên ku li Misirê kiriye,
10 kirinên wî, yên li Çemê Urdunê
wêde ji her du qiralên Amorê re, ji
Sîhonê ku qiralê Heşbonê yî û ji
Ogê qiralê Başanê, yê ku li Aştarotê
serweriyê dajo, bihîstin. 11 Li ser
vêya, serokên me û hemûya gelê
welatên me, ji me re ûsa gotin:
Bona pêşwazî kirina wan, xwa-
rinê bigirin cem xwe, derkevin rê
û ji wan re; em qûlê we ne; bo vê
yekê, em dixwazin ku hûn bi me re
peymanek aşitiyê çêbikin, bibêjin!
12 Gava bona ku em werin cem we,
derketin rê, ev nanê ku me bi zewê-
deyî[2] ji malên xwe ve rahiştibûn,
zehf germ bûn. Binêrin, niha ziwa
û ifnikî bûne. 13 Ev meşkên ku
me xemrê dagirtibûn wan, nû bûn.
Binêrin çawa şeqitîne û çiriyane. Ji
ber ku em ewqas rê hatin, kinc û
pêlavên me peritîn.
14 Û Îsraêliyan, berî ku bi XU-
DAN ve bişêwirin, xwarinên ku
Gîboniyan pêşkêş kirine rahiştin.
15 Û Yêşû jî bona ku wan sax
bihêle soz da û bi wan re peymana
aşitiyê çêkir. Serokên civakê jî di
derheqê bi peymanê ve girêdayî
manê de sondê xwarin. 16 Çi heye
ku, sê roj li pêy peymanê wusa
bû, bihîstin ku ew bi cîranî û di
nav wan de dijîn. 17 Li ser vêya
derketin rê û paşî sê roja gîhaştin
bajarên wan. Ev bajarna Gîbon,
Kefîra, Beerot û Kîryat-Yearîm
bûn. 18 Û lawên Îsraêl li wan ne-
xistin; ji ber ku serokên civakê, bi
navê Xwedayê Îsraêlê XUDAN
ve sondê dabûn. Û hemûya civakê
li dijî serokan gotegot kirin. 19 Û
hemûya serokan jî bi gotina: Me
bi navê Xwedayê Îsraêlê XUDAN
ve sondê dane; bo vê yekê em ni-
karin ku destê xwe li wan xînin,
bersivê dan. 20 Ji ber ku me sondê
dayîne, em ê wan bi saxî bihêlin,
ya na em ê rastî xezebê bên.
21 Û dawiyê ji gel re gotin: Em
wan bi saxî berdin. Lê belê bila ew
bi bona hemû civakê êzing jêkirin
û av kişandinê ve bên wezîfedar
kirin. Bi vî awayî, serokan soza ku
dabûn girtin.
22 Û li pêy, Yêşû bangî wan kir û
got: Hûn li nêzîkî me dijîn, lê belê
çima bi gotina; ji dûr ve hatina
xwe we me xapandin? 23 Bo vê

[1] Gîboniyan: Di teksta Îbranîtî de bi gotina Hîvî derbas dibe. Gîbonî jî ji gelên Hîvê bûn.

[2] Bi xwarinî.

yekê, êdî hûn bi nalet kirî ne. Hûn
ê tim kole bimînin. Bona perest-
geha Xwedayê min hûn ê êzing jê
bikin û avê bikişînin!
24 Û wan bi gotina: Efendiyê me,
me emrê ku XUDAN, Xwedayê
te daye qûlê xwe Mûsa bihîstin,
bersivê dan. Me bihîstin, emir da
Mûsa ku hemûya welatê bide we
û hûn jî hemû kesên ku li welêt
dijîn tune bikin. Em zehf ji we tir-
siyan, bi tirsa can me wusa kirin.
25 Û niha em di destê te de ne. Ya
li gor te dad e û rast e bike!
26 Û li ser vêya, Yêşû wan ji des-
tê lawên Îsraêl ve xelas kir, bona
kuştina wan emir neda. 27 Û wê
rojê wan bona civakê û di hatinê
de[1] bona pêşkêşîgeha ku dê li cîhê
ku XUDAN hilbijêre, bê çêkirin
bi êzing jêkirin û av kişandinê ve
wezîfedar kir. Heta îro jî vî karî
kirin û hatin.

*Amorî têne mexlûb kirin*

Îbr 3,11; Eyû 9,7

10 Û qiralê Orşelîmê Adonî-
Sedek, gava bihîst ku, çawa
Yêşû Erîha bi dest ve xist û qiralê
wê ji holê ve rakir, bajarê Ayê jî
bi dest ve xist û bitûmî xera kir,
qiralê wê kuşt, gelê Gîbonê jî bi
Îsraêliyan re peymanekî aşitiyê
çêkirine û tevî wan dijîn; 2 ket tir-
sekî mezin. Ji ber ku Gîbon, mîna
bajarên ku qiral lê dijîn bajarekî
mezin bû; ji ber ku ji bajarê Ayê
jî mezintir bû û hemûya zilamên
wê mêrxas bûn. 3 Ji ber vê yekê
qiralê Orşelîmê, Adonî-Sedek ji
qiralê Hebronê Hoham, qiralê
Yarmûtê Pîram, qiralê Lakîşê
Yafiya û qiralê Eglonê Debîr re
vê nûçeyê şand: 4 Werin alîkariyê
bi min re bikin, em êrîşî Gîbonê
bikin. Ji ber ku Gelê Gîbonê bi
Yêşû û gelê Îsraêlê re peymanekî
aşitiyê çêkirin!
5 Û qiralê Orşelîmê, qiralê Heb-
ronê, qiralê Yarmûtê, qiralê
Lakîşê, qiralê Eglonê, pênc qi-
ralên Amorê, artêşên xwe civan-
din û gişt pev re, li hemberê Gî-
bonê arteşgehê ava kirin û dawiyê
dest bi êrîşê kirin.
6 Û Gîboniyan ji Yêşûyê ku li
Gîlgalê, di artêşgehê de yî re vê
nûçeyê şandin: Me qûlên xwe
tenê nehêle. Bi lezî were alîkariya
me. Ji ber ku hemû qiralên Amorî,
yên ku li herêma çiyayî ne, li dijî
me yek bûn.
7 Û li ser vêya Yêşû, tevî hemû
şervanên xwe û zilamên xwe yî
mêrxas ji Gîlgalê ve derket rê. 8 Û
di vê navberê de XUDAN ji Yêşû
re got: Ji wan metirse! Ji ber ku
min wan dane destê te. Dê qet yek
jî nikaribe li dijî te di berxwe de
bide! 9 Û Yêşûyê ku ji Gîlgalê ve
derket û di tûmiya şevê de rê çû,
nişka ve êrîşî Amoriyan kir. 10 Û

1 Dema pêşiyê de.

XUDAN, Amoriyan li ber Îsraêliyan da şaş kirinê. Îsraêliyan jî li Gîbonê wan rastî xerabûnek mezin anîn; di tûmiya rêya ku derdikeve[1] Beyt-Horonê de heta Azeka û Makkeda bera wan dan û wan kuştin. 11 Û XUDAN li ser Amoriyên ku ji Îsraêliyan ve direviyan, di tûmiya rêya ku ji Beyt-Horonê de dadikeve Azeka, ji ezmanan ve zîpikên gir barand. Yên ku di bin zîpika ku dibariya de canê xwe dan, ji yên ku lawên Îsraêl wan bişûr ve kuştine zêdetir bûn.

12 Roja ku XUDAN, Amoriyan li hemberî Îsraêliyan rastî xerabûnê anî, Yêşû li ber gel, bi vî awayî bangî XUDAN kir:

Bisekine, ya roj, li ser Gîbonê û tu heyv, tu jî li ser şetê Ayyalonê!

13 Heta ku gel ji neyarên xwe ve tola xwe hilda, roj sekinî û heyv jî li cîhê xwe ma. Ma ev bûyera, di Pirtûka Yaşar de nehatiye nivîsandinê? Û roj nêzîkî tûmiya rojekê di nava ezman de sekinî, ji avabûnê re dereng ma. 14 Û ne berî vêya û ne jî paşê vêya rojek, mîna ku wê rojê XUDAN xwesteka mirovekî bihîstiye, qet nebûye. Ji ber ku, XUDAN li aliyê Îsraêlê şer kir.

15 Û paşî vêya, Yêşû tevî hemûya gelê Îsraêl vegeriya artêşgeha Gîlgalê.

*Kuştina qiralên Amorî*

16 Ev her pênc qiral reviyabûn û di şikeftek li Makkedayê de xwe veşartibûn. 17 Û bi gotina: Pênc qiral, di şikeftekî li Makkedayê de xwe veşartî hatin dîtin; nûçeyê gîhandin Yêşû. 18 Û Yêşû got: Kevirên mezin bigindirînin devê şikeftê, bona ku wir biparêzin, zilaman bi wezîfedar bikin. 19 Lê belê hûn nesekinin, berra neyaran bidin; li pêy wan bigihêjin û bibin asteng ku bila negihêjin bajaran. Xwedayê we XUDAN, wan daye destên we!

20 Yêşû û lawên Îsraêl neyaran, bi gellekî giranî mexlûb kirin[2] û hemûyên wan tune kirin. Yên ku bikar anîn û xelas bûn jî xwe avêtin bajarên bi sûran ve hatine zivirandin. 21 Dawiyê hemûya gel, di nava ewlekariyê de vegeriyan artêşgeha Makkedayê, cem Yêşû. Qet kesekî li dijî lawên Îsraêl devê xwe venekir[3].

22 Dawiyê Yêşû ji zilamên xwe re got: Devê şikeftê vekin, her pênc qiralî derxînin û bînin cem min! 23 Û wusa kirin û wan jî her pênc qiralî: Qiralê Orşelîmê, qiralê Hebronê, qiralê Yarmûtê, qiralê Lakîşê, qiralê Eglonê ji şikeftê derxistin û ji wî re anîn. 24 Û wusa bû ku, gava qiralan derxistin ber Yêşû, Yêşû

---

1 Diçe.
2 Xera kirin.
3 An jî: Qet kesekî li dijî lawên Îsraêl tiştekî negot.

bangî hemûya zilamên Îsraêlê kir.
Û ji fermandarên zilamên cengê
yên ku pê re çûne re got: Nêzîk we-
rin û pêlên xwe deynin ser histuyê
van qiralana! Û fermandaran nêzîk
hatin û lingên xwe danîn ser histuyê
wan. 25 Û Yêşû ji wan re got: Me-
tirsin, bêzar mebin; xwurt û mêrxas
bibin! Dê XUDAN, hemû neyarên
ku hûn bi wan re şer bikin, bîne vî
halî. 26 Li pêy wê, Yêşû li wan xist
û wan kuşt û wan bi pênc darî ve
daliqandin û heta êvarê, ûsa di dar
de daliqandî man.
27 Û li ser emrê Yêşû, di roj ava
de cesedên qiralan ji daran daxis-
tin, avêtin şikefta ku wan xwe tê
de veşartibûn û devê şikeftê bi ke-
virên mezin ve girtin. Ew kevirana
heta vê rojê li wir sekinîne.
28 Û Yêşû eynî rojê Makkeda bi
dest ve xist[1], qiral û gelê wê ji şûr
ve derbas kir. Li bajêr yekî zindî
jî nehişt, giştikan kuşt. Ji qiralê
Erîhayê re çi kiribe, wan tiştan ji
qiralê Makkedayê re jî kir.

*Bi destxistina Bajarên Başûrê*

5.Mûs 7,1-6; 20,16-18

29 Û Yêşû tevî hemûya Îsraêli-
yan, ji Makkedayê bi ser Lîbnayê
ve meşiya û li dijî Lîbnayê şer kir.
30 XUDAN bajêr û qiralê wê,
da destê Îsraêliyan. Û wî (Yêşû)
bi şûr li wê û hemû bicanên di
wê de bûn, xist[2]. Ji wê tu kesê
ku ji bermayiye nehişt. Ji qiralê
Erîhayê re çi kiribe, wan tiştan ji
qiralê bajêr re jî kir.
31 Paşî vêya, Yêşû tevî gelê
Îsraêl, ji Lîbnayê, bi ser Lakîşê
ve meşiya. Li hemberê bajêr
artêşgehê danî û derbasî êrîşê
bû. 32 XUDAN Lakîşê da destê
Îsraêliyan. Û wî roja din bajêr
bi destê xwe ve xist. Û mîna li
Lîbnayê çêkiribû, hemûya gelê
bajêr ji şûr ve derbas kir. 33 Di vê
navberê de Horamê qiralê Gezerê
hate alîkariya Lakîşê. Lê Yêşû wî
û artêşa wî mexlûb kir; kesî zindî
nehişt û giştikan kuşt. 34 Û Yêşû
û tevî wî hemûya gelê Îsraêl, ji
Lakîş, bi ser Eglonê ve meşiya û
li hemberê bajêr artêşgehê danî
û derbasî êrîşê bû. 35 Û wan, wê
di wê rojê de bi dest ve xistin û
wê dan ber devê şûr û li gor her
tiştên ku wî li Lakîşê kiribû, hemû
canên di wê de ne, di wê rojê de
bitûmî tune kirin.
36 Û paşî vêya, Yêşû tevî gelê
Îsraêl, ji Eglonê, bi ser Hebronê
ve meşiya. 37 Û bajêr bi dest xwe
ve xistin, qiralê wê, gelê wê û
hemû bicanên li bajêr in, wê rojê
ji şûr ve derbas kirin. Mîna li Eg-
lonê kiribûn, her kesî kuştin; kesî
bi saxî nehiştin. 38 Û paşî vêya,
Yêşû tevî gelê Îsraêlê vegeriya û

1 Girt.

2 An jî: Da ber devê şûr.

êrîşî Debîrê kir. 39 Û wê û qiralê
wê û hemû bajarên wê girt û wan
ji şûr ve derbas kir û hemû canên
ku di wê de bûn bi tûmî tune kir;
kesek jibermayî nehişt; çawa ku ji
Hebron û Lîbnayê û ji qiralê wan
re kiribe, ji Debîr û qiralê wê re jî
wusa kir.
40 Û bi vî awayî, Yêşû tevî herê-
ma çiyayî, Negeb, Şefela û palên
çiyayan, hemûya welat bi dest
ve xist û hemûya qiralên li van
dera ne, rastî mexlûbiyetê bir. Û
qet kesekî neparast. Li gor emrê
Xwedayê Îsraêl XUDAN, kesekî
sax nehişt, giştikan kuşt. 41 Û
Yêşû, li herêma Goşenê, ya ku
ji Kadeş-Barnêya heta Gazzayê,
heta Gîbonê dirêj dibe xist. 42 Û
Yêşû di derbekê de hemûya van
qiralan û welatên wan bi dest ve
xist. Ji ber ku Xwedayê Îsraêl
XUDAN, bona Îsraêlê şer kiribû.
43 Û li pêy, Yêşû tevî gelê Îsraêl
vegeriya artêşgeha li Gîlgalê ye.

*Bi destxistina Bajarên Bakûr*

11 Û qiralê Hasorê Yabîn, yên
ku bûne û qediyane bihîst,
ji qiralê Madonê Yobaba, ji qiralê
Şîmron û qiralê Akşafê; 2 ji qi-
ralên li herêma çiyayî ya li bakur,
li Arava ya li başûrê gola Kînne-
ret e, ji yên li Şefela ne û li rojava
ji qiralên li pişta bajarên Dorê ne;
3 ji Kenaniyên, Amoriyên, Hîtîti-
yên û Periziyên li herêmên li roj-
hilat û rojava ne û ji Yebûsiyên
ku li herêma çiyayî ne, ji Hîviyên
ku li herêma Mîspayê ya li qûn-
tara çiyayê Hermonê ve dijîn re,
nûçeyê şand. 4 Û van qiralana,
tevî hemû artêşên xwe û tevî
leşkerên xwe yî qasî qûma behrê
bêhejmar, bi gellek hejmarî hesp
û erebeyên xwe yî şer derketin
rê. 5 Û hemûya van qiralan, bona
ku li dijî Îsraêl şer bikin, yek bûn
û hatin qeraxa avên Meromê û li
wir artêşgehê danîn.
6 Di vê navberê de, XUDAN ji
Yêşû re; bi gotina: Ji wan me-
tirse! bang kir; ji ber: Ez ê wan
hemûyan, sibê di van saetan de li
ber Îsraêl, bi erdê ve raxim. Hes-
pên wan seqet bike û agir bi ere-
beyên wan bixe. 7 Û bi vî awayî,
Yêşû û tevî hemû artêşa xwe di
demek kes ne li bendê bû de, bi
ser qiralên ku li qeraxa avên Me-
romê ne ve meşiya û êrîşî wan
kir. 8 Û XUDAN wan dan destê
Îsraêl. Û Îsraêliyên ku wan rastî
têkçûnê anîbûn, heta Sayda Me-
zin, Mîsrefot-Mayîm û li rojhilatê
heta newala Mîspe berra yên ku
direviyan dan; li wan xistin û tu
kesî bi saxî nehiştin. 9 Û Yêşû
mîna emrê XUDAN kir, hespên
wan seqet kir û erebeyên wanî şer
di agir de şewitand.
10 Û Yêşû li pêy vêya vegeriya û
Hasor bi dest ve xist. Û qiralê wê
bi şûr ve kuşt. Ji ber ku Hasor, ji

berê ve serê hemû qiraletiyan bû.
11 Û wan, hemû bicanên li bajêr
ji şûr ve derbas kirin û tune kirin.
Tenê kesekî hilmê digire jî ne-
parastin. Û li pêy wê, wî agir bi
Hasor ve xist. 12 Û bi vî awayî
hemûyên van bajaran û hemû
qiralên wan bi dest ve xist. Û li
gor emrê Mûsayê qûlê XUDAN,
giştikan ji şûr ve derbas kir û tune
kir. 13 Lê Îsraêliyan, xeynî Haso-
ra ku Yêşû agir pêxistibû, agir bi
bajarek jî ji bajarên li ser giran ha-
tine ava kirin nexistin. 14 Û lawên
Îsraêl, li van bajaran hemû mal û
heywanan bi xenîmetî rahiştin, lê
belê heta giştikî helaq kirin, hemû
zilaman jî ji şûr ve derbas kirin
û kuştin û kesekî hilmê digire jî
nehiştin. 15 Mîna ku XUDAN ji
qûlê xwe Mûsa re emir dayiye,
Mûsa jî bi vî awayî emir da Yêşû;
Yêşû jî wusa kir; ji hemû tiştên ku
XUDAN bi emirî dabû Mûsa, tu
tiştekî kêm nekir.
16 Û bi vî awayî Yêşû, herêma
çiyayî, hemû herêma Negev û
Goşenê, çiyayên Îsraêl, Şefela û
Araba û berên van çiyana, ji çiyayê
Halaqê ku li aliyê Seîrê ve bilind
dibe, heta Baal-Gada ku ji deşta
Lubnanê ya ku li binya çiyayê
Hermonê ye, hemû erdan bi dest
ve xist. 17 Û hemû qiralên van girt
û li wan xist û kuşt. 18 Yêşû bi de-
mekî dirêj, bi hemûya van qiralan
re şer kir.
19 Xeynî Hîviyên ku li Gîbonê
dijîn, bajarek bi lawên Îsraêl re
peymana aşitiyê çêkirine nebû.
Wan, hemûyên bajarên din bi şer
kirinê ve bi dest ve xistin. 20 Ji
ber, yê bona ku li dijî Îsraêl şer
bikin dilên wan hişk dikir, XU-
DAN bû. Bi vî awayî mîna ku
XUDAN emir daye Mûsa, hey-
fa Îsraêliyan bi wan ve nehat,
giştikan kuştin û tune kirin.
21 Û Yêşû wê wextê hat û Anaki-
yan ji çiyayiyê, ji Hebronê, ji De-
bîrê, ji Anabê û ji hemû herêmê çi-
yayî yên Cihûda û ji herêmê çiyayî
yên Îsraêlê ve jêkir û avêt; Yêşû,
wan tevî bajarên wan, bitûmî tune
kir. 22 Di erdên ku di destê lawên
Îsraêl de bûn, qet Anakî neman; lê
li Gazzayê, Gat û Aşdodê de yên
ku sax mayîne hebûn. 23 Û mîna
ku XUDAN ji Mûsa re gotibû,
Yêşû hemûya welat bi dest ve xist
û bi mêrasî di nava eşîrên Îsraêlê
de, li gor ezbetan, li gor qismên wê
da. Û bi vî awayî welat ji cengê
gîhaşt aramiyê.

*Qiralên ku têne mexlûb kirin*

12 Û lawên Îsraêl, erdên van
qiralên ku, ji rojhilata Çemê
Urdunê, hemûya rojhilata Arabayê
û ji newala Arnon heta çiyayê Her-
monê bi dest ve xistin. 2 Sîhonê
qiralê Amorê, yê ku li Heşbonê
rûdinişt: Qiraletiya wî ji Aroera
li qeraxa newala Arnonê – ji nava

newalê – dest pê dike, heta newa-
la Yaboka ku sînora Ammoniya yî
dirêj dibe û nêviyê Gîleadê digirt
nava xwe. Rojhilata herêma Ara-
ba jî aidî wî bû. 3 Vê dera, ji gola
Kînnerat heta gola Araba û heta
Gola Lût ve dirêj dibû, li rojhilatê
digihîşt Beyt-Yeşîmot û li başûr
jî digihîşt berên Pîsga. 4 Ji Refa-
yiyên ku sax mayîne, Ogê qiralê
Başanê, yê ku li Aştarot û Edrei-
yê de rûdinişt. 5 Û Og, rêvebiriyê
ji çiyayê Hermonê û Salekayê û
hemûya Başana ku ji Geşûriyan
heta sînora Maakayiyan û nêviya
Gîleadê ya ku heta sînora Sîhonê
qiralê Heşbonê dirêj dibû re dikir.
6 Mûsayê qûlê XUDAN û lawên
Îsraêl li wan xistin û Mûsayê qûlê
XUDAN, erdên vana bi milkî
da Eşîrên Rûben û Gad û nêviyê
eşîra Manaşşe.
7 Û qiralên ku Yêşû û lawên Îs-
raêl, li wan xistibûn vana bûn:
Erdên van qiralên ku, erdên li
rojava Çemê Urdunê ne, yên ku
ji Baal-Gada ku li newala Lubna-
nê yî, heta çiyayê Halakê yî; ev
in: Yêşû, herêma çiyayî ya aidî
gelên Hîtît, Amor, Kenan, Perîz,
Hîv û Yebûse, Şefala, 8 herêma
Arabayê, palên çiyayîn, çolê û
Negevê, di nava eşîrên Îsraêlê de,
bi milkî par kir.
9 Qiralê Erîhayê, qiralê bajarê
Ayê, ya ku nêzîkî Beytelê yî,
10 qiralê Orşelîmê, qiralê Heb-
ronê, 11 qiralê Yarmûtê, qiralê
Lakîşê, 12 qiralê Eglonê, qiralê
Gezerê, 13 qiralê Debîrê, qiralê
Gederê, 14 qiralê Hormayê, qiralê
Aradê, 15 qiralê Lîbnayê, qiralê
Adûlamê, 16 qiralê Makedayê,
qiralê Beytelê, 17 qiralê Tapûahê,
qiralê Heferê, 18 qiralê Afekê,
qiralê Şaronê, 19 qiralê Madon,
qiralê Hasorê, 20 qiralê Şîmron-
Meronê, qiralê Akşafê, 21 qiralê
Taanakê, qiralê Megîdoyê, 22 qi-
ralê Kedeşê, qiralê Yoknemê, ya
ku li Karmelê yî, 23 qiralê Dorê,
yê ku li piştên Dorê yî, qiralê
Goyîmê, yê ku li Gîlgalê yî 24 û
qiralê Tîrsayê. Bi giştî sîh û yek
qiral bûn.

### *Cîhê ku dê bêne sitendin*

Birên 13-22

13 Û Yêşû mezin bûbû û teme-
na wî gelekî pêş ve çûbû û
XUDAN ji wî re got: Êdî tu pîr
bû, temena te gellekî mezin bû.
Lê belê, hîn pirr erdên ku bi milkî
bên stendin hene.
2 Erdên ku bên stendin, vana ne:
Hemûya herêmên Geşûrî û Filistê;
3 herêma ku ji şeta Şîhora ku ji roj-
hilata Misirê yî li bakur heta sînorên
Ekronê dirêj dibe, aidî Kenaniyan
dihat hesibandin. Pênc mîritiyên
Filistiyan, ên ku navê wan Gazza,
Aşdot, Aşkelon, Gat û Ekron e û
erdên Aviyan; 4 li başûrê, hemûya
erdên Kenaniyan; heta Afekê, yanê

sînora Amorê; Meara ya aidî Say-
dayiyan e; 5 Erdên Gebayiyan;
hemûya erdên Lubnanê, ên ku li
aliyê rojhilatê ne, yên ku ji Baal-
Gada ku li bera çiyayê Hermonê yî,
heta ketina Hamatê; 6 ez ê yên ku
li herêma çiyayî, ya ku ji Lubnanê,
heta Mîsrefot-Mayînê dijîn û hemû
gelê çiyayî û hemûya Saydayiyan ji
ber lawên Îsraêl rahêlim û bavêjim;
mîna ku emir dabûm te, van deran,
bi pişkê ve di nava Îsraêliyan de bi
milkî par bike!

*Erdên li Rojhilata Çemê Urdunê*

4.Mûs 32; 5.Mûs 3,8-17

7 Û van erdan ji niha ve di nava
neh eşîrî û nêviyê eşîra Manaşşe
de, bi mêrasî par bike!
8 Nêviyê eşîra Manaşşe û eşîrên
Rûben û Gad, ji ber ku Mûsayê
qûlê XUDAN erdên li rojhilata
Çemê Urdunê dabû wan, ji mêrasê
ve para xwe, wekî Mûsayê qûlê
XUDAN dabû wan, stendibûn.
9 Ew erdna vana bûn: Deşta Me-
deva ya heta ji Aroera ku li qera-
xa newala Arnonê, heta bajarê di
nava newalê û Dîbonê de dirêj
dibe 10 û hemû bajarên heta sînorê
Ammonê, yên Sîhonê qiralê Amor
bûn, ê ku li Heşbonê serweriyê
ajotiye 11 û erdên Gîlead, Geşûr û
Maaka, hemû herêma Başanê, ya
ku heta çiyayê Hermon û Salka;
12 hemû erdên li Başanê dimînin
ên qiral Og, yê ku yek ji Refayi-
yên ku sax mayîne yî û li Aştarot
û Edreî de serweriyê ajotiye. Axên
ku Mûsa bi bin xistina qiralan bi
dest ve xistibû, vana bûn. 13 Lê
lawên Îsraêl, Geşûriyan û Maa-
kayiyan ji axên wan ve neajotin
û Geşûriyan û Maakayiyan, heta
îroj di nava Îsraêliyan de jiyanê
domandin.
14 Lê mêrasê neda ezbeta Lêwiyi-
yan; mîna ku jê re gotibû mêrasa
wê, pêşkêşiyên biagir ve tête
pêşkêşî kirin ya Xwedayê Îsraêl
XUDAN e.

*Erdên ji Lawên Rûben re hatine dayîn*

15 Û erdên ku Mûsa li gor hejmara
ezbetan daye eşîra Rûbenê, vana
bûn: 16 Herêma ji Aroera li qera-
xa newala Arnonê yî, heta bajarê
di nava newalê de yî, dirêj dibe
û hemû zozana li dora Medeba
yî; 17 Heşbon û hemû bajarên li
zozana pê ve girêdayî ye: Dîbon,
Bamot-Baal û Beyt-Baal-Meon
18 û Yahsa, Kedemot û Mefaat,
19 Kîryatayîm û Sîbma û Seret-
Şahara ku li ser çiyayê di newalê
de yî û 20 Beyt-Peor û palên Pîs-
ga û Beyt-Yeşîmot û 21 hemûya
welatê Sîhonê, qiralê Amorê, yê
ku li bajarên di zozanan de yî û li
Heşbonê serweriyê ajotiye. Mûsa,
Sîhon û Mîrên Midyanê, yên ku
li erdên di serweriya Sîhon de ne
jiyane – Evî û Rekem, Sûr, Hûr
û Reba – mexlûb kiribû. 22 Û di

nava yên ku hatibûn kuştin de,
ji aliyê lawên Îsraêl ve ji şûr ve
hatibûn derbas kirin, Remildar
Balamê lawê Beor jî hebû. 23 Û
sînorê lawên Rûben heta Çemê
Urdunê xwe sipartibû. Bajarên
ku tevî gundan, li gor hejmara ez-
betan ji Lawên Rûben ve hatibûn
dayîn vana bûn.

*Erdên ji Lawên Gad re hatine dayîn*

24 Û Mûsa li gor hejmara ezbetên
Gad, mêrasê da eşîra Gadê jî.
25 Û erdên ku dabû wan, vana
bûn: Herêma Yazer û hemû ba-
jarên Gîleadê û nêviyê erdên lawên
Ammoniyan, yên ku heta Aroera
nêzîkî Rabba dirêj dibin û 26 herê-
ma ji Heşbonê heta Ramat-Mîspe
û Betonîmê û ji Mahanayîmê heta
sînorê Debîrê 27 û Beyt-Haram
û Beyt-Nîmra û Sûkkot û Safon,
erdên ji Sîhonê qiralê Heşbonê ve
mayîne, aliyê rojhilata Çemê Ur-
dunê û yê ku heta başûrê gola Kîn-
neratê ve dirêj dibe. 28 Bajarên ku
tevî gundên xwe, li gor hejmara
ezbetan bi mêrasî ji lawên Gad re
hatibûn dayîn vana bûn.
29 Û Mûsa li gor hejmara ezbetan,
ji erdê ve bi mêrasî dabû nêviyê ez-
beta Manaşşe û bona nêviyê ezbe-
ta lawên Manaşşe, li gor eşîrên wê
bûn. 30 Ev erdan ji Mahanayîmê
ve dest pê dikir û welatê Ogê qi-
ralê Başanê – hemûya Başanê – û
hemûya cîhên rûniştinên Yaîrê,
yên li Başanê, yanê bi tevî şêst ba-
jarî 31 û nêviyê Gîleadê û Aştarot û
Edreî yên ku di bin serweriya Ogê
qiralê Başanê de bûn, digirt nav
xwe. Van derana, ji nîjada Makîrê
lawê Manaşşe re, li gor hejmara
ezbetên wê ji nêviyê lawên Makîr
re hatibûn cihê kirin.
32 Erdên ku dema Mûsa li deştên
Moabê par kirin, yên ku ji Çemê
Urdunê wê de ne û li rojhilata
Erîhayê ne vana bûn. 33 Lê belê
Mûsa mêrasê neda ezbeta Lêwî.
Mîna ku soz dabû, mêrasa wan bi
xwe Xwedayê Îsraêl XUDAN e.

*Parkirina erdên li rojavaya Çemê Urdunê*

14 Û erdên ku lawên Îsraêl
wan li Kenanê ji xwe re
mêras stendine ev in, ev erdna
ji aliyê kahîn Eleazar û Yêşûyê
lawê Nûn û ser eşîrên[1] eşîrê lawên
Îsraêl ve, bi mêrasî di nava lawên
Îsraêl de hatine par kirin. 2 Mîna
ku XUDAN bi navdîtiya Mûsa ve
emir dayîbû, mêrasan di nava neh
eşîr û nêviyê eşîrekê de bi pişkê ve
hatin par kirin. 3 Ji ber ku Mûsa,
mêrasa du eşîrî û nêviyê eşîrekî li
rojhilata Çemê Urdunê de dabû.
Lê belê tevî wan, ji mêrasê parê
nedabû Lêwiyiyan. 4 Ji ber ku
yên ji nîjada Ûsiv dihatin, bi navê
Manaşşe û Efrayîm, du eşîrî pêk

[1] Mîr.

dianîn. Û ji Lêwiyiyan re, xeynî
bajarên ku lê bicîh bibin û li dora
van bajaran bona heywan û malên
xwe çêregehan, ji erdê ve par ne-
hat dayîn. 5 Lawên Îsraêl, li gor
emrê ku XUDAN dabû Mûsa çê-
kirin û welatê par kirin.

*Hebronê didin Kaleb*

6 Û di vê navberê de lawên Cihûda
hatin Gîlgalê cem Yêşû û Kalebê
lawê Yefûnne ji nîjada Kenaz in,
ji Yêşû re ûsa got: Tu dizanî ku
XUDAN, li Kadeş-Barnêyayê
de ji zilamê Xwedê Mûsa re di
derheqê min û te de çi gotiye.
7 Dema Mûsayê qûlê XUDAN,
bona ku lêkolînê li welat bikim
min ji Kadeş-Barnêyayê ve şand,
ez çel salî bûm. Û bi dilek vekirî,
dîtinê xwe jê re gotim. 8 Û çi heye
ku hemnîjadên[1] min, yên ku bi min
re hatibûn, tirsê dan gel. Lê belê
ez bi tûmî di rêya Xwedayê xwe
XUDAN de çûm. 9 Bo vê sedemê
Mûsa, wê rojê, bi gotina: Ji ber
ku tu bi tûmî di rêya Xwedayê
min XUDAN de çûyî, erdên ku
te pêlên xwe avêtiye wan, dê
heta bêdawîbûnê ji te û lawên te
re bibin mêras! sondê da. 10 Û
XUDAN bi soza xwe girt û jiyana
min domand. Gava Îsraêliyan ji
çolê ve derbas bûn, ji ser roja ku
XUDAN ji Mûsa re van gotinan
gotibû û heta niha çel û pênc
sal derbas bûn. Niha ez heyştê
û pênc salî me. 11 Îro jî, ez qasî
roja ku Mûsa min şandîbû, xwurt
im. Ez mîna wê rojê dîsa xwurt
im û dikarim herim û werim şer.
12 Û mîna ku XUDAN wê rojê
soz dabû, vê herêma çiyayî niha
bide min. Te jî wê rojê bihîstibû ku
li wir Anakî dijîn û bajarên wanî
bi kelehan ve zivirî hene. Dibe ku
XUDAN alîkariyê bi min re bike
û ez ê, mîna ku XUDAN ji min re
gotibû, wan ji wir biqewirînim.
13 Û Yêşû, Kalebê lawê Yefûnne
pîroz kir û Hebronê, bi mêrasî da wî.
14 Bi vî awayî, Hebron, heta niha
bû mêrasa Kalebê lawê Yefûnneyê
ku ji nîjada Kenaz e. Ji ber ku ew, bi
tûmî di rêya Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN de çûbû. 15 Navê Hebronê,
yê kevin Kîryat-Arba bû. Arba navê
zilamê ku herî xwurtê Anakiyan bû.
Û bi vî awayî dawiya şer hat û
welat gîhaşt aşitiyê.

*Erdên ji Lawên Cihûda re hatine dayîn*

15 Û li gor hejmara ezbetan,
herêma ku ji lawên Cihûda re
hatibû dayîn, li başûrê heta sînorê
Edomê, li herî başûr jî heta çola
Sînayê dirêj dibû. 2 Û sînorên wê
yî başûrê ji kendava aliyê başûrê
gola Lûtê dest pê dikir 3 û derbasî
başûrê bihûrka Akrabbîm û ji wir jî
derbasî çola Sînayê dibû û ji başûrê
Kadeş-Barnêya û derdiket Hesron

[1] An jî: Birayên min.

û Addar, ji wir jî ber bi Karka di-
fitilî û 4 Asmon derbas dikir, di tû-
miya newala Misirê de dirêj dibû û
di Behrê de dawî didît. Sînorên wê
yî başûrê vêya bû. 5 Û sînorê wê
yî rojhilatê di tûmiya qeraxa gola
Lûtê de, heta devê Çemê Urdunê
dirêj dibû. Sînorê wê yî bakur, ji
kendava devê gola Çemê Urdunê
dest pê dikir 6 û dirêjî Beyt-Hogla
dibû û ji bakurê Beyt-Arabayê
derbas dibû û digîhişt kevirê Bo-
hanê lawê Rûben. 7 Û sînor, ji
newala Akkorê derdiket Debîrê û
li başûrê newalê, ji Gîlgala ku li
ber qiyameya Adûmmîmê yî berê
xwe dida bakur, ji vir dirêjî avên
En-Şemeşê dibû û xwe disipart
En-Rogelê. 8 Û dawiyê ji newala
Ben-Hînnomê derbas dibû û der-
diket piştên başûra bajarê Yebûs,
yanê Orşelîmê û ji wir jî ber bi
şaxa çiyayê li newala Hînnoma
ku li aliyê rojava newala Refaîmê
bilind dibû, 9 ji wir jî ber bi çav-
kaniya avên Neftoahê ve difitilî,
dirêjî bajarên li çiyayê Efronê ne
û vedigeriya Baala, yanê Kîryat-
Yearîmê. 10 Û sînorê ku ji Baala
ber bi rojhilatê, çiyayê Seîrê ve
diçe, di tûmiya piştên bakurê çi-
yayiya Yearîmê de, ev Kesalon e,
dirêj dibû û dadiket Beyt-Şemeşê,
digîhişt Tîmnayê. 11 Û sînor, ji
qeraxa Ekronê ve berbi bakur ve
derdiket û sînor dirêjî Şîkeronê
dibû û derbasî çiyayê Baala dibû û
derdiket Yavneelê û dawiyên sînor
di behrê de bû.
12 Û sînorê wê yî rojava, qera-
xa behra mezin[1] bû. Dorbedor
sînorên ezbetên ku ji lawên Cihû-
da ve dihatin vana bûn.
13 Û Yêşû li gor emrê ku ji XUDAN
ve stendibû, Kîryat-Arba ya ku li
herêma Cihûda yî, yanê Hebronê,
bi mêrasî da Kalebê lawê Yefûnne;
ev Arba, bavê Anakiyan bû. 14 Û
Kaleb, sê lawên Anak, Şeşay, Ahî-
man û Talmayê ku ji nîjada wî ve
tên ji wir qewirandin. 15 Û ji wir, bi
ser gelê Debîrê ve meşiya. Lê belê
navê Debîrê, yê berê Kîryat-Sefer
bû. 16 Û Kaleb got: Ez ê qîza xwe
Aksa, bi jinitî bidim kesê ku gelê
Kîryat-Seferê mexlûb bike û wir bi
dest ve bixe.
17 Û Otnîelê lawê Kenazê ku birayê
Kaleb bû, wê bi dest ve xist û li ser
vêya, wî qîza xwe Aksa, bi jinitî da
Otnîel. 18 Û gava qîzik gîhaşt cem
Otnîel, bi heterî xwest ku ji bavê wê
zeviyekê bixwaze. Û Kaleb ji qîza
xwe ya ku ji kerê xwe ve dadiket,
bi gotina: Xwestekek te heye? pirsî.
19 Û qîzikê got: Ez xelatekê dixwa-
zim! Madem ku te erdên li başûrê
ne daye min, çavkaniyên avê jî bide
min! Bi vî awayî Kaleb, çavkaniyên
avê yên berjor û berjêrê da wê.
20 Li gor hejmara ezbetên wê,
mêrasa lawên Cihûda vêya bû.

[1] Behra spî.

21 Û bajarên lawên Cihûda, yên
ku ber bi sînorê Edomê, herî li
başûrê diman vana bûn:
Kabseel û Eder û Yagûr û 22 Kîna
û Dîmona û Adada û 23 Kedeş
û Hasor û Yîtnan û 24 Zîf û Te-
lem û Bealot 25 û Hasor-Hadatta
û Keriyot-Hesron, yanê Hasor,
26 Amam û Şema û Molada û
27 Hasar-Gadda û Heşmon û
Beyt-Pelet û 28 Hasar-Şûal û
Beer-Şeba û Bîzyotya, 29 Baala û
Iyîm û Esem û 30 El-Tolat û Kesîl
û Horma û 31 Zîklag û Madmanna
û Sansanna û 32 Lebaot û Şîlhîm
û Ayîn û Rîmmon; tevî gundên
xwe bîst û neh bajar.
33 Yên ku li Sefela ne, Eştaol
û Sora û Aşna û 34 Zanoah û
En-Gannîm, Tappûah û Enam,
35 Yarmût û Adûllam, Soho û
Azeka û 36 Şaarayîm û Adîtayîm,
Gedera û Gederotayîm; tevî gun-
dên xwe çardeh bajar.
37 Senan û Hadaşa û Mîgdal-
Gad û 38 Dîlan û Mîspe û Yok-
teel û 39 Lakîş û Boskat û Eglon
û 40 Kabbon û Lahmas û Kîtlîş û
41 Gederot, Beyt-Dagon û Naa-
ma û Makedda; tevî gundên wan
şanzdeh bajar. 42 Lîbna û Eter û
Aşan û 43 Yîftah û Aşna û Nesîv û
44 Keyîla û Akzîv û Mareşa; tevî
gundên xwe neh bajar.
45 Tevî gund û navçeyên wê Ekron;
46 Rojavaya Ekron; hemû gundên li
dora Aşdot in. 47 Tevî gund û nav-
çeyên wê Aşdot; Gazza û tevî gund
û navçeyên wê yên heta newala
Misirê û qeraxa behra mezin diçin.
48 Û li herêma çiyayî Şamîr û Yattîr
û Soko; 49 Danna û Kîryat-Sanna,
ew Debîr e; 50 Anab û Eştemo û
Anîm; 51 Goşen û Holon û Gîlo;
tevî gundên xwe yanzdeh bajar.
52 Arab û Dûma[1] û Eşan 53 û
Yanûm, Beyt-Tappûah û Afeka
û 54 Hûmta, Kîryat-Arba, yanê
Hebron û Sîor; tevî gundên wê
neh bajar. 55 Maon, Karmel û Zîf
û Yûtta û 56 Yîzreel û Yokdeam û
Zanoah; 57 Kayîn, Gîbea û Tîmna;
tevî gundên xwe deh bajar.
58 Halhûl, Beyt-Sûr û Gedor û
59 Maarat û Beyt-Anot û Elte-
kon; tevî gundên xwe şeş bajar.
60 Kîryat-Baal, yanê Kîryat-
Yearîm û Rabba; tevî gundên xwe
du bajar.
61 Li çolê Beyt-Araba, Mîddîn û
Sekaka û 62 Nîbşan û Îr-Hamme-
lah[2] û En-Gedî; tevî gundên xwe
şeş bajar.
63 Lê lawên Cihûda hêz neanîn
ku Yebûsiyên li Orşelîmê dijîn, ji
wir derxînin. Yebûsî, heta îro bi
lawên Cihûda re li Orşelîmê jiyan
û hatin.

1 Dûma: Di hinek tekstan de bi gotina Rûma derbas dibe.

2 Yanê bajarê Xwê.

*Erdên ji Lawên Efrayîm re hatine dayîn*

16 Û sînorên erdên ku di
pişkê de ji lawên Ûsiv re
ket; li rojhilatê, ji rojhilata avên
Erîhayê ve, ji Çemê Urdunê ya ku
li Erîhayê dest pê dike û derbasî
çolê dibî, ji Erîhayê, derdikevî
herêma çiyayiya Beytelê 2 û ji
Beytelê derbasî Lûzê dibû û dirêjî
sînora Arkiyan, heta Atarotê. 3 Û
sînor di rojava de dadikete erdên
Yafletiyan, herêma jêrîn ya Beyt-
Horonê ji wir jî dadiket Gezerê û
di behrê de diqediya.
4 Û lawên Ûsiv, Manaşşe û
Efrayîm mêrasên xwe stendin.
5 Û sînorên erdên ku li gor hejma-
ra ezbetên wan ji lawên Efrayîm
re, bi mêrasî hatine dayîn, li roj-
hilatê ji Atarot-Addarê ve ber bi
jor, heta Beyt-Horonê dirêj dibû û
6 sînor ji bakur li Mîkmetatê difi-
tilî rojava, Taanat-Şîlo, ji rojhilata
bajêr ve derbas dibû 7 û dirêjî Ya-
noahê dibû û ji wir jî dadiket Ata-
rot û Naarat û Erîhayê derbas dikir
û digihîşt Çemê Urdunê. 8 Sînor
ji Tappûahê ber bi rojava ve dirêjî
newala Kana dibû û dawiya wê li
behrê bû. Li gor hejmarên ezbetên
wê, mêrasa lawên Efrayîm vêya
bû. 9 Xeynî vêya, ji erdên ku keti-
ne para lawên Manaşşe jî bajarên ji
lawên Efrayîm re hatine cuda kirin
û gundên van bajaran hebûn.
10 Û Kenaniyên ku li Gezerê di-
jiyan, ji wir neajotin. Lê belê Ke-
naniyan heta îro di nava lawên
Efrayîm de rûdinin û bûn qûlên
suxrekar.

*Erdên ji Lawên Manaşşe re hatine dayîn*

4.Mûs 27,1-11; Serw 1,27-36

17 Û bona eşîra Manaşşeyê
vijag hate kişandin, ji ber
ku ew lawê Ûsiv yê mezin bû. –
Gîlead û Başan, ji Makîrê ku lawê
mezin yê Manaşşe bû re, hatibûn
dayîn. Ji ber, Makîrê ku bapîrê
Gîleadiyan bû, şervanek mezin
bû –. 2 Û ji bo lawên din, yên
ku ji nîjada Manaşşe ve dihatin,
– bo lawên Abîezer û bo lawên
Helek û bo lawên Asrîel û bo
lawên Şekem û bo lawên Hefer û
bo lawên Şemîda – di hundirê vê
pişkê de bûn. Vana li gor ezbetên
xwe lawên mêr yên Manaşşeyê
lawê Ûsiv bûn.
3 Lê belê lawên Selofhedê, lawê
Hefer, lawê Gîlead, lawê Makîr,
lawê Manaşşe tune bû; lê tenê
qîzên wî hebûn û navên qîzên wî
ev in: Mahla, Noa, Hogla, Mîlka
û Tîrsa.
4 Û vana çûn hemberî kahîn Elea-
zar û Yêşûyê lawê Nûn û serokan
û wusa gotin: XUDAN, emir da
Mûsa ku di nav birayên me de,
mêrasê bide me jî. Û li ser vî emrê
XUDAN, Yêşû di nav birayên ba-
vên wan de mêrasê da wan. 5 Û
bi vî awayî, ji eşîra Manaşşe re,
ji herêmên Gîlead û Başanê, yên

ku li rojhilata Çemê Urdunê ne
deh parên din hatin dayîn. 6 Ji
ber ku, li cem zazên mêr, zazên
qîz yên Manaşşe jî ji erdê ve parê
stendibûn. Lê Herêma Gîleadê jî,
ji lawên Manaşşe yên din re ha-
tibûn dayîn.
7 Û sînorê Manaşşe, ji sînorê
Aşerê ve dirêjî Mîkmetata ku
nêzîkî Şekemê yî dibû û ji vir ber
bi başûrê ve difitilî û digihîşt er-
dên gelê En-Tappûah. 8 Erdên ku
hawirdorên bajarê Tappûah gir-
tibûn, yên Manaşşe bûn. Lê belê
bajarê Tappûah ya ku li sînorê
Manaşşe bû, aidî lawên Efrayîm
bû. 9 Û dawiya sînor, dadiket
newala Kana. Li başûrê newalê
di nava bajarên ku aidî Manaşşe
de ne, bajarên aidî Efrayîm jî he-
bûn. Sînorên Manaşşe di tûmiya
bakura newalê de dirêj dibû û di
behrê de dawî didîtin. 10 Erdên
li başûrê yên Efrayîm û erdên li
bakurê jî yên Manaşşe bûn. Bi vî
awayî, herêma Manaşşe bi behrê
ve di bakur de, bi Aşerê û di roj-
hilatê de jî bi Îssakarê ve hatibû
sînor kirin.
11 Û di nav erdên Îssakar û
Aşer de Beyt-Şean û navçeyên
wê, Îbleam û navçeyên wê, Dor,
yanê gelê piştên Dor û navçe-
yên wê, gelê En-Dor û navçeyên
wê, gelê Taanak û navçeyên wê,
gelê Megîddo û navçeyên wê, sê
gir aidî Manaşşe bûn. 12 Çi heye
ku lawên Manaşşe hêz neanîn ku
hemûya van bajaran bi dest ve
bixin. Ji ber ku Kenanî bi biryar
bûn ku, dê li van deran bijîn.
13 Û wusa bû ku, dema lawên
Îsraêl xwurt bûn, Kenaniyan
kirin suxrekar û wan bi tûmî ne-
qewirandin.
14 Û lawên Ûsiv hatin cem Yêşû
û gotin: Ma çima te bi mêrasî tenê
bi pişkekî û parekî da me? Em bi
gelekî ajawe ne. Ji ber ku XU-
DAN, heta îro, heta ku tu bibêjî
me zêde kir.
15 Û Yêşû, bi gotina: Ger hûn
ewqas ajawe ne û herêma çiyayî
ya Efrayîmê ji we re teng tê, der-
kevin daristanên ku di erdên Perî-
ziyan û Refayiyan de ne û ji xwe
re cîh vekin, bersivê da wan.
16 Û lawên Ûsiv gotin: Herêma
çiyayî têra me nake û him yên
ku li Beyt-Şean û navçeyên wê
û him jî yên di newala Yîzraêl de
rûdinin, erebeyên şer yên hesinî
yê hemû Kenaniyên ku li deştê
dijîn hene!
17 Û Yêşû ji mala Ûsiv, ji Efrayîm
û ji Manaşşe re got: Tu netewe-
yek zêde yî û hêza te mezin e; dê
tenê pişkek te nebe; 18 lê belê dê
herêma çiyayî bibe ya te; çawa ku
daristan e, tuyê wê jê bike û cîhên
wê yên hilkişandinê dê bibin yên
te; ji ber ku Kenanî xwurt in û
xwediyê erebeyên hesinî yên şer
in jî; tuyê wan biqewirîne!

*Parkirina erdên wekî din*

Yêşû 14,1-5; 4.Mûs 33,53

18 Û hemûya civaka lawên
Îsraêl li Şîloyê civiyan û
li wir, Çadira Civandinê danîn û
welat di bin rêvebiriya wan de
bû[1]. 2 Çi heye ku hîn heft eşîrên
Îsraêl yên ku ji erdê ve parên xwe
nestendine, hebûn.
3 Yêşû ji lawên Îsraêl re got: Ma
hûn ê kengê vê pûçbûna ji ser xwe
ve bavêjin, bona ku bi dest ve xisti-
na erdên ku Xwedayê bapîrên we
XUDAN daye we, hîn hûn ê çiqasî
bisekinin? 4 Ji her eşîrê sê merivî
hilbijêrin. Ez ê wan, bona ku lê-
kolînê li welat ve bikin, bişînim.
Bila sînorên cîhê ku dê ji xwe re
bikin mêras nîşan bidin, derbasî
qeydê bikin û vegerin cem min.
5 Û bi van erda bi heft herêmî ve
cuda bikin. Bila Cihûda li herêma
wê yî başûr, lawên Ûsiv jî li herêma
bakur bimînin. 6 Paşî ku we welêt
bi heft herêmê nîşan kirin û derbasî
qeydê kirin, wê ji min re bînin. Û
ez ê li ber Xwedayê me XUDAN,
di nav we de pişkê bikişînim! 7 Ji
ber ku di nava we de para Lêwiyi-
yan nîne; lê mêrasa wan, bona XU-
DAN kahîntî kirin e. Û eşîrên Gad
û Rûben û nêviyê eşîra Manaşşe
jî, erdên li rojhilata Çemê Urdunê,
yên ku Mûsayê qûlê XUDAN daye
wan bi mêrasî stendine.

[1] An jî: Di bin destê wan de bû.

8 Û zilaman rabûn û çûn û Yêşû ji
yên bona ku welêt derbasî qeydê
bikin diçûn re, bi van gotinan emir
da û got: Herin û lêkolînê li welêt
bikin û wê derbasî qeydê bikin û
vegerin cem min û li vir, li Şîloyê,
ez ê li ber XUDAN, bona we pişkê
bikişînim. 9 Û zilaman derketin rê
û di welêt de geriyan; paşî ku ba-
jar bi bajar, bi heft herêmî derbasî
qeydê kirin pê ve vegeriyan cem
Yêşûyê ku li Şîloyê, di artêşgehê
de yî. 10 Û Yêşû li Şîloyê, li ber
XUDAN bona wan pişkê kişand û
Yêşû li wir ji lawên Îsraêl re li gor
qismên wan welêt par kir.

*Erdên ji Lawên Benyamîn re hatine dayîn*

11 Û li gor hejmaran ezbetên wê
bona lawên Benyamîn pişk hate
kişandin. Û herêma ku bi para
wan ve ket, di nava erdên lawên
Cihûda û Lawên Ûsiv de dima.
12 Û sînora herêmên wan ji ba-
kur, ji Çemê Urdunê ve dest pê
dikir, bi piştên bakur yên Erîhayê
ve bilind dibû û di rojava de heta
herêma çiyayî ve dirêj dibû, di
beyarên Beyt-Avenê de dawî
didît. 13 Û sînor ji wir derbasî
Lûzê, ev Beytel e, piştên başûrê
Lûzê ve dibû û dadiket Atarot-
Addara ku li ser çiyayê başûrê
Beyt-Horonê ve avakirî 14 û di
rojhilata herêma, ji çiyayê ku li
başûrê de Beyt-Horonê ve difilitî
başûrê û li bajarê Kîryat-Baal,

ev Kîryat-Yearîm e, ya ku aidî
lawên Cihûda dawî didît. Ev ali-
yê rojava bû.
15 Û aliyê wê yî başûr, ji beroşkên
rojava[1] ya Kîryat-Yearîmê ve dest
pê dikir û dirêjî çavkaniya avên
Neftoahê dibû. 16 Û sînor ji vir
derbasî palên çiyayê li newala
Ben-Hînnoma ku li bakurê newa-
la Refaîmê yî dibû û newala Hîn-
nom derbas dikir ji wir li piştên
başûrê Yebûsê, ji wir jî dadiket
En-Rogelê. 17 Û sînora ku ji ba-
kurê diziviri, derdikeve Gelîlota
ku li hemberî rêkaşa En-Şemeş û
Adûmmîmê yî, dadiket kevirê Bo-
hanê lawê Rûben 18 û dawiyê ji
piştên bakurê newala Arabayê ve
derbas dibû û dadigerî Arabayê,
19 ji vir derbasî palên bakur yên
Beyt-Hogla û di kendava bakur
ya gola Lûtê de, di devê başûr ya
Çemê Urdunê de diqediya. Sînora
Başûrê vêya bû. 20 Û Çemê Ur-
dunê, sînorê rojhilatê ava dikir.
Sînorê mêrasa ku li gor hejmara
ezbetên lawên Benyamîn ketibû
para wan, bi hawirdorî ev bû.
21 Û bajarên ku li gor hejmara ez-
betên wê, ketibû para lawên Ben-
yamîn vana bûn: Erîha, Beyt-Hog-
la, Emek-Kesîs 22 û Beyt-Araba û
Semarayîm û Beytel û 23 Avvîm
û Para û Ofra û 24 Kefar-Ammonî
û Ofnî û Geba; tevî gundên wan
donzdeh bajar. 25 Gîbeon û Rama,
Beerot û 26 Mîspe, Kefîra û Mosa
û 27 Rekem û Yîrpeel û Tarala,
28 Sela û Haelef, Yebûs, ev
Orşelîm e, Gîbat û Kîryat; tevî
gundên wan çardeh bajar. Li gor
hejmara ezbetên wê, mêrasa lawên
Benyamîn vêya bû.

*Erdên ji Lawên Şîmeûn re hatine dayîn*

1.Dîr 4,24-33

19 Pişka duwemîn, ji Şîmeûn
re, li gor hejmara ezbetên
wê ji eşîra lawên Şîmeûn re ket.
Û mêrasa wan, di nava sînorên
mêrasa ku ji lawên Cihûda re ke-
tiye de dima. 2 Û vê mêrasa, Beer-
Şeba û Şeba û Molada, 3 Hasar-
Şûal û Bala û Esem û 4 Eltolad û
Betûl û Horma û 5 Zîklag, Beyt-
Markabot û Hasar-Sûsa û 6 Beyt-
Lebaot û Şarûhen digirt nava xwe.
Tevî gundên xwe, bi tûmî sêzdeh
gund. 7 Ayîn, Rîmmon û Eter û
Aşan; tevî gundên xwe çar bajar.
8 Û hemûyê gundên ku li dora
van bajarên ku dirêjî heta Baalat-
Beer, yanê Ramaya başûrê jî aidî
lawên Şîmeûn bûn. Li gor hej-
mara ezbetên wê mêrasa lawên
Şîmeûn vêya bû. 9 Mêrasa ku ji
lawên Şîmeûn re hatibû dayîn, ji
para lawên Cihûda bû. Ji ber ku
para lawên Cihûda, ji hewcedari-
ya wan ve zêdetir bû. Û ji ber

1 Ji beroşkên rojava ve dest pê dike; an jî: Ji beroşkên wê ve dest pê dike û ber bi rojavayê diçe.

vê yekê, lawên Şîmeûn di nava
mêrasa wan de mêrasê stendin.

*Erdên ji Lawên Zebûlûn re hatine dayîn*
1.Mûs 49,13; 5.Mûs 33,18-19

10 Û pişka sêwemîn, li gor hej-
mara ezbetên wê, ket para lawên
Zebûlûn. Û sînorê erdên wê dirêjî
heta Sarîtê dibû. 11 Û sînor, di ro-
java de ber bi Marala ve derdiket
û digihîşt Dabbeşetê û dirêjî ne-
wala li hemberî Yokneamê, 12 ji
Sarîtê diziviri rojhilatê, rojhilata
rojê, sînora Kîslot-Taborê û ji wir
jî xwe dida Daveratê û derdiket
Yafîa. 13 Û ji wir dîsa derbasî
rojhilatê, Gat-Hefer û Et-Kasînê
û dirêjî Rîmmon dibû, ber bi Nea
ve diziviri. 14 Û sînora wê ya ba-
kurê, ji vir, ber bi Hannatonê di-
ziviri û di newala Yîftah-Elê de
dawî didît. 15 Û Kattat, Nahalal,
Şîmron û Îdala û Beytlehem; tevî
gundên xwe donzdeh bajar bûn.
16 Li gor hejmara ezbetên wê,
mêrasa lawên Zebûlûn tevî gun-
dên xwe, van bajaran bûn.

*Erdên ji Lawên Îssakar re hatine dayîn*
1.Mûs 49,14-15; 5.Mûs 33,18-19

17 Pişka çaremîn, ji Îssakar re, li
gor hejmara ezbetên wê, ket para
lawên Îssakar. 18 Yîzreel û Kes-
sûlot û Şûnem û 19 Hafarayîm
û Şîon û Anaharat û 20 Rabbît
û Kîşyon û Ebets û 21 Remet û
En-Gannîm û En-Hadda û Beyt-
Passes di nava van sînoran de
diman. 22 Û sînor di tûmiya Ta-
bor û Şahasuma û Beyt-Şemeşê
de dirêj dibû û di Çemê Urdunê
de diqediya. Tevî gundên xwe
şanzdeh bajar bûn. 23 Li gor hej-
mara ezbetên wê, mêrasa lawên
Îssakar, tevî gundên xwe van ba-
jarana bûn.

*Erdên ji Lawên Aşer re hatine dayîn*
1.Mûs 49,20; 5.Mûs 33,24-25

24 Û pişka pêncemîn, li gor
hejmara ezbetên wê, ket para
lawên Aşer. 25 Û bajarên ku di
nava sînorên wê de bûn; Helkat
û Halî û Beten û Akşaf û 26 Al-
lammelek û Amad û Mîşal bûn.
Û sînor di rojavayê de digihîşt
Karmel û Şîhor-Lîbnatê. 27 Û
ji vir diziviri rojhilatê, Beyt-Da-
gonê û di tûmiya sînora Zebûlûn
û newala Yîftah-Elê de dirêj dibû
û di bakur de digihîşt Beyt-Emek
û Nehîelê. Ji bakurê Kabûlê û
28 derbasî Ebron û Rehob, Ham-
mon û Kana dibû û heta Saydaya
Mezin ve derdiket. 29 Û ji vir di-
ziviri Rama û dawiyê dirêjî bajarê
Sûrê, ya ku bi kelehan ve ziviri
dibû û difitilî Hosa û li herêma
Akzîbê, di behrê de dawî didît.
30 Û Ûmma, Afek û Rehob; tevî
gundên xwe, bîst û du bajar û
31 di nava mêrasa ku li gor hej-
mara ezbetên wê ji lawên Aşer ve
hatiye dayîn de dima.

*Erdên ji Lawên Naftalî re hatine dayîn*
5.Mûs 33,23

32 Pişka şeşemîn ji Naftalî re, li
gor hejmara ezbetên wê, ket para
lawên Naftalî. 33 Û sînorên wê
ji Helef û darçiloya mezin ya ku
li Saanannîmê bû, dest pê dikir û
ji ser Adamî-Nekeb û Yabneelê
direjî Lakkûmê dibû û di Çemê
Urdunê de dawî didît. 34 Û sînor
ji vir berê xwe dida rojava û ji
Aznot-Taborê ve derbas dibû û
digihîşt Hûkokê. Û li başûrê erdên
Zebûlûn, li rojava erdên Aşer, li
rojhilatê jî Çemê Urdunê[1] hebû.
35 Û bajarên ku bi kelehan ve
dorgirtî vana bûn: Sîddîm, Ser
û Hammat, Rakkat, Kînneret û
36 Adama û Rama û Hasor û
37 Kedeş û Edreî û En-Hasor û
38 Yîron û Mîgdal-El, Horem û
Beyt-Anat û Beyt-Şemeş; tevî
gundên xwe nozdeh bajar. 39 Li
gor hejmara ezbetên xwe mêrasa
lawên Naftalî tevî gundên xwe,
van bajarana bûn.

*Erdên ji Lawên Dan re hatine dayîn*
1.Mûs 49,16-17; 5.Mûs 33,22

40 Pişka heftemîn, li gor hejmara
ezbetên wê, ket para lawên Dan.
41 Û bajarên ku di nava mêrasa
wan de diman vana bûn: Sora û
Eştaol û Îr-Şemeş û 42 Şaalabbîn
û Ayyalon û Yîtla û 43 Elon û
Tîmnata û Ekron û 44 Elteke û
Gîbbeton û Baalat û 45 Yehût
û Bene-Berak û Gat-Rîmmon,
46 Me-Yarkon û tevî erdên li
hemberî Yafa, Rakkon. 47 Û
sînorê lawên Dan ji wan re teng
hat û lawên Dan derketin û bi
Leşemê re cengê kirin û wê girtin
û dan devê şûr û wê ji xwe re ki-
rin milk û li wir bi cîh bûn û li gor
navê bapîrê xwe Dan, navê Dan
li Leşemê kirin. 48 Li gor hej-
mara ezbetên wê mêrasa lawên
Dan tevî gundên xwe van ba-
jarana bûn.

*Para Yêşû*

49 Û paşî ku lawên Îsraêl, karê
li gor herêman par kirina erdan
qedandin, ji erdên xwe parê dan
Yêşûyê lawê Nûn. 50 Li gor emrê
XUDAN, bajarê ku wî dixwest,
Tîmnat-Seraha ku li herêma çi-
yayî ya Efrayîm bû dan wî. Û wî[2]
bajêr selihand û li wir bi cîh bû.
51 Erdên ku bi mêrasî, ji aliyê
kahîn Eleazar û Yêşûyê lawê
Nûn û serezbetên eşîrên Îsraêlê
ve, li Şîloyê, li ber XUDAN, di
deriyê Çadira Civandinê de bi
pişkê ve hatine par kirin vana
bûn. Û bi vî awayî, par kirina
welêt temam kirin.

1 Li rojhilatê jî Çemê Urdunê, an jî: Li rojhilatê jî qeraxên Cihûda yên Çemê Urdunê.

2 Yêşû.

*Bajarên Stargeh*
4.Mûs 35,9-34; 5.Mûs 19,1-13

20 Û XUDAN ji Yêşû re got:
2 Mîna ku bi navdîtiya
Mûsa emir dabûm we, ji lawên
Îsraêl re bibêje ku bila bajarên ji
wan re bibin stargeh, ji xwe re
hilbijêrin. 3 Ûsa ku, yekî ku ne bi
xwestinê, bêhemdî miroveki bu-
kujî, bila bireve wir. Û bila cîhek
we yî, ji ber kesê ku tolê bistîne
revandin û sitirandinê hebe.
4 Û kesê ku bireve ji van bajaran
yekî û bila here deriyê bajêr û
rewşa xwe ji pêşhatiyên bajêr re
bibêje. Û bila ew jî wî qebûlî ba-
jêr, cem xwe bikin û cîhekî bi wan
re rûnê bidin wî. 5 Û ger kesê ku
dixwaze tolê bistîne, li pêy mêr-
kuj bikeve, bila pêşhatiyên bajêr
mêrkuj nedin destên wî. Ji ber ku
yê mêr kuştiye, ji berê de girrê bi
kesê ku kuştiye re negirtibû, bê
xwestin[1] wî kuşt. 6 Û heta ku ev
kes derkevî pêşiya civakê û ser-
kahînê ku wê demê wezîfedar e
bimire, divê li wî bajarî bimîne[2].
Û paşî wê dikare vegere bajarê ku
jê reviyayî, mala xwe.
7 Û bi vî awayî, Kedeşa li Celî-
la ku li herêma çiyayî ya Naftalî
ye û Şekema ku li herêma çiyayî
ya Efrayîm e û Kîryat-Arba, yanê
Hebrona ku li herêma çiyayî ya
Cihûda ye bijartin. 8 Û ji Urdunê
wêdetir, li hemberê Erîhayê, berbi
rojhilatê, ji ezbeta Rûbenê, li çola
deşta Betserî û ji ezbeta Gadê
Ramota li Gîleadê yî û ji ezbeta
Manaşşe Golana li Başanê yî bi-
jartin. 9 Bajarên ku bona yekî Îs-
raêlî an jî yekî xerîb di nava lawên
Îsraêl de dijî, bê hemdî zilamekî
bikuje, berî ku li ber civakê bên
daraz kirin, ji aliyê kesên ku di-
xwazin tolê hildin nên kuştin ha-
tibûn bijartin vana bûn.

*Bajarên bona Lêwiyiyan hatine cihêkirin*
1.Dîr 6,50-60.66-81; 5.Mûs 33,8-11

21 Û serezbetên Lêwiyî, di
erdên Kenanê de, li Şîloyê
çûn cem kahîn Eleazar û Yêşûyê
lawê Nûn û serezbetên eşîrên
Îsraêlê 2 û gotin: XUDAN bi
navdîtiya Mûsa ve emir dabû ku,
divê bona em rûnin bajar, bona
heywanên me jî çêregehan bidin
me! 3 Û li ser vêya, lawên Îsraêl
li gor emrê XUDAN ji mêrasên
xwe, tevî çêregehên wan, van ba-
jaran dan Lêwiyiyan:
4 Pişka yekemîn ji ezbetên Kohat
re ket. Bi pişkê ji lawên Harûnê
kahîn yên ji Lêwiyiya ne; ji ezbe-
ta Cihûda û ji ezbeta Şîmeûniyan
û ji ezbeta Benyamîn re sêzdeh
bajar ketin. 5 Û ji lawên Kohat

[1] Bê zanîn, bêhiş, an jî: Bêhemdî.
[2] Ger li paşî darazkirinê, bêsûciya mirov bê îspat kirin, divê ew li bajêr bimîne.

yên li paşê mayîne re, bi pişkê
ve deh bajarên ku ji ezbetên aidî
eşîrên Efrayîm û ji ezbeta Dan û ji
nêviyê ezbeta Manaşşe re ketin.
6 Û bi pişkê ve, sêzdeh bajarên ku
ji ezbetên eşîrên Îssakar û ji ezbeta
Aşer û ji ezbeta Naftalî û ji nêviya
ezbeta Manaşşe ya ku li Başanê
yî, ji lawên Gerşon re ketin.
7 Donzdeh bajarên ku li gor hej-
mara eşîrên wan ji ezbeta Rûben û
ji ezbeta Gad û ji ezbeta Zebûlûn,
ji lawên Merarî re ketin.
8 Û bi vî awayî, mîna ku XU-
DAN bi navdîtiya Mûsa ve emir
dabû, lawên Îsraêl bi pişkê ve van
bajaran dan Lêwiyiyan.
9 Û bajarên ku ji eşîra lawên Cihû-
da û ji eşîra lawên Şîmeûn ve hati-
ne stendin û navên wan li jêr ve ha-
tine rêz kirin 10 û vana ji bo lawên
Harûn yên ku ji ezbetên Kohatê
Lêwiyî ne re bûn; ji ber ku pişka
pêşîn ya wan bû. 11 Û li herêma çi-
yayî ya Cihûda, Kîryat-Arba, yanê
Hebrona ku bi navê Arbayê bavê
Anak ve tête bîranîn û çêregehên li
dorê ne, da wan. 12 Lê zevî û gun-
dên bajêr jî, bi milkî ji Kalebê lawê
Yefûnne re hatibûn dayîn.
13 Û bajarên Hebrona ku, bona
kesên bê hemdî mêrkuştine bi
sitargehî hatiye bijartin, Lîbna û
14 Yattîr û çêregeha wê û Eştemoa
û çêregeha wê û 15 Holon û çêre-
geha wê û Debîr û çêregeha wê
û 16 Ayîn û çêregeha wê û Yût-
ta û çêregeha wê û Beyt-Şemeş
û tevî çêregeha wê, bi tûmî, ji du
eşîran neh bajar ji lawên Harûnê
kahîn re hatin dayîn. 17 Ji ezbeta
Benyamîn Gîbon û çêregeha wê,
Geba û çêregeha wê, 18 Anatot û
çêregeha wê û Almon û çêregeha
wê; çar bajar.
19 Bi vî awayî, tevî çêregehên
wan, hejmara tûmiya bajarên ku ji
kahînên ku ji nîjada Harûn ve ne
re hatine dayîn gîhaşt sêzdehan.
20 Û eşîrên lawên Kohat, gava
em bên ezbetên Lêwiyî, yên ku
ji lawên Kohat ve mane, bajarên
ku di pişkê de, ji wan re ketibûn
ji ezbeta Efrayîm bûn. 21 Vana,
Şekema li ser çiyayiya Efraîm e,
bona kesên bê hemdî mêrkuştine
bajarê sitargeh hatiye bijartin û
çêregeha wê, Gezer û çêregeha
wê 22 û Kîbtsayîm û çêregeha
wê û Beyt-Horonê û çêregeha wê
dan, çar bajar. 23 Û ji eşîra Dan;
Elteke û çêregeha wê, Gîbbeton û
çêregeha wê, Ayyalon û çêrege-
ha wê, Gat-Rîmmon û çêregeha
wê; çar bajar. 24 Ji nêviyê eşîra
Manaşşe, Taanak û çêregeha wê
25 û Gat-Rîmmon û çêregeha wê;
du bajar. 26 Bi vî awayî, hejmara
hemû bajarên ku tevî çêregehên
xwe ji ezbetên ku ji lawên Kohat
ve mane deh bajar bûn.
27 Û bajarê Golan, ya ku bona
kesên bê hemdî mêrkuştine sitar-
geh hatiye bijartin û Be-Eştera ya

li Başana ku aidî nêviyê ezbeta
Manaşşe yî û tevî çêregehên xwe,
ji lawên Gerşon re du bajar 28 û
çar bajarên ji eşîra Îssakar ve hati-
ne stendin, Kîşyon û çêregeha wê,
Daberat û çêregeha wê, 29 Yar-
mût û çêregeha wê, En-Gannîm û
çêregeha wê; 30 çar bajarên ji ez-
beta Aşer ve hatine stendin, Mîşal
û çêregeha wê, Abdon û çêregeha
wê, 31 Helkat û çêregeha wê û
Rehob û çêregeha wê 32 û sê ba-
jarên tevî çêregehên xwe ji eşîra
Naftalî ve hatine stendin, yên
Kedeşa bona mirovên bê hemdî
mêr kuştine re bibe bajarê sitargeh
hatiye bijartin, ya li Celîlê û Ham-
mot-Dor û Kartan ji lawên Gerşon
yên ku ji ezbetên Lêwiyiya ye re
hatine dayîn. 33 Hejmara bajarên
ku tevî çêregehên xwe li gor hej-
mara ezbetên wê ji Gerşoniyan re
hatine dayîn, gîhaşt sêzdehan.

34 Û ji ezbetên lawên Merarî, ji
Lêwiyiyên li pêy mane jî; bi giştî
çar bajarên ji eşîra Zebûlûn ve
hatine stendin, Yokneam û çêre-
geha wê û Karta û çêregeha wê û
35 Dîmna û çêregeha wê, Nahalal
û çêregeha wê, çar bajarên ji
36 eşîra Rûben ve hatine stendin,
Betser û çêregeha wê, Yahats û
çêregeha wê, 37 Kedemot û çêre-
geha wê û Mefaat û çêregeha wê,
çar bajar. 38 Û bi giştîka bajarên
ji ezbeta Gad ve hatine stendin
Ramota bona kesên ku bêhemdî
mêr kuştine, bajarê sitargeh ha-
tiye bijartin, ya li Gîleadê û tevî
çêregehên xwe û Mahanayîm û
tevî çêregehên xwe. 39 Heşbon û
tevî çêregehên xwe, Yazer û tevî
çêregehên xwe hatin dayîn; gişt
çar bajar. 40 Hejmara bajarên ku
tevî çêregehên xwe li gor hejmara
ezbetên wê ji lawên Merarî, yanê
li pêy mayiyên eşîrên Lêwiyiyan
re, bi pişkê ve hatine dayîn, gîhaşt
donzdehan.

41 Bi tûmiya hejmara bajarên ku
di nava erdên lawên Îsraêl de ne
û tevî çêregehên xwe ji Lêwiyi-
yan re hatine dayîn, digihîşt çel û
heyştan. 42 Li dora hemûya van
bajaran jî çêregehên wan hebûn.
Bajarê bê çêregeh tune bû.

43 Û welatê ku XUDAN bo dayînê
soz dabû bapîrên wan, bi tûmî da
Îsraêliyan. Û wan welêt ji xwe re
kirin milk û li wir bi cîh bûn. 44 Û
mîna ku XUDAN ji bapîrên wan
re sondê dayîbû, wan ji her alî ve
gîhand rehetiyê. Yek jî ji neyarên
wan, hêz negîhand ku li ber wan
bisekine. XUDAN giştikan da
destê wan. 45 Qet sozek jî, ji sozên
ku XUDAN dabû gelê Îsraêliyan
vala derneketin; gişt hatin cîh.

*Vegera Eşîrên ku li rojhilatê bicîh bûne*

22 Wê demê Yêşû, eşîrên Rû-
ben û Gad û nêviyê Eşîra
Manaşşe civand. 2 Û ji wan re
got: We hemû tiştên ku Mûsayê

qûlê XUDAN emir dabû we anîn
cîh. We hemû emirên min jî anîn
cîh. 3 Heta îro, di ewqas demî de
we birayên xwe tenê nehiştin;
emrê ku Xwedayê we XUDAN,
we hewcedar kiribû, we anîn cîh.
4 Û hûn dibînin, mîna ku Xwe-
dayê we XUDAN ji birayên we
re gotibû, wan gîhand rehetiyê.
Niha rabin, vegerin malên xwe
yên di erdên ji Çemê Urdunê wê
de, yên ku Mûsayê qûlê XUDAN,
bi milkî dabû[1] we. 5 Di cîhanîna
emirên ku Mûsayê qûlê XUDAN
daye we û Zagona Pîroz de zehf
balkêş bin. Ji Xwedayê xwe XU-
DAN hez bikin, bi tûmî di rêya ku
nîşan daye de bimeşin û emirên
wî bînin cîh. Bi wî re girêdayî[2]
bimînin û bi hemûya dilê xwe û
bi hemûya canê xwe ve xizmetê ji
wî re bikin. 6 Û Yêşû, wan pîroz
kir û bi rê kir. Û ew jî vegeriyan
malên xwe.
7 Û Mûsa li Başanê erd dabû nê-
viyê eşîra Manaşşe. Lê Yêşû jî ji
nêviyê dinî eşîrê re, di rojavaya
Urdunê de, di nava birayên wanî
din de erdê dabû wan.
Û dema Yêşû van eşîran pîroz
dikir û dişand malên wan, ji wan
re axifî û got: 8 Bi hebûnek me-
zin, bi gellek hejmarî heywan, bi
zêr û zîv, tûnc û hesin û bi gellekî
kincan ve vegerin malên xwe.
Xenîmeta ku we ji neyarên xwe
bi dest ve xistine bi birayên xwe
re par bikin!
9 Bi vî awayî Rûben û lawên Gad
û nêviya eşîra Manaşşe, ji Şîloyê
ya ku di erdên Kenanê de yî, ji
cem lawên Îsraêl ve cuda bûn; ji
bo vegerin erdên li Gîleadê – er-
dên bi xwe milkên wan e –, yên ku
li gor emrê XUDAN bi navdîtiya
Mûsa ji xwe re kirine welat, der-
ketin rê.
10 Û lawên Rûben û lawên Gad
û nêviya eşîra Manaşşe, dema
gîhaştin (Çemê) Urdunê, aliyê wê
yî di erdên Kenanê de mayiye, li
qeraxa Urdunê pêşkêşîgehek me-
zin û rewneqdar ava kirin.
11 Û civaka lawên Îsraêl, yên gava
bihîstin ku, lawên Rûben û lawên
Gad û nêviya ezbeta Manaşşe li
qeraxa Çemê Urdunê, li pêşiya
welatê Kenanê di erdên ku 12 aidî
lawên Îsraêl in de pêşkêşîgehekê
ava kirine, bona ku li hemberî
wan şer bikin, hemûya civaka
lawên Îsraêlê li Şîloyê civiyan.
13 Û li pêy, lawên Îsraêl Pîne-
hasê lawê kahîn Eleazar şandin
herêma Gîleadê, cem lawên Rû-
ben û lawên Gad û nêviya eşîra
Manaşşe yê. 14 Û ji her eşîrek Îs-
raêliyan nûnêrekî, bi giştî deh se-
rok eşîrî jî pê re şandin. Û ji vana
her yek, di nav hezarên Îsraêliyan

1 An jî: Daye we.
2 Dilsoz.

de serokê eşîrekî bûn. 15 Û gava
nûnêr hatin erdê Gîleadê, cem
lawên Rûben û lawên Gad û nêvi-
ya eşîra Manaşşeyê vana têgîhan-
din: 16 Civaka XUDAN: We îro ji
xwe re pêşkêşîgehekê ava kirin û
dev ji li pêyçûna XUDAN berdan
dibêje; hûn li dijî XUDAN rabûn,
ma hûn ê çawa vê xayîntiyê ji
Xwedayê Îsraêl re bikin? 17 Ma
gunehê Peor têra me nekir? Civa-
ka XUDAN, ji ber wî rastî bêtarê
hat. Me heta îro jî, xwe ji wî gu-
nehî paqij nekirin. 18 Ma îro hûn
dev ji li pêy çûna XUDAN ber di-
din? Ger hûn îro serî li XUDAN
re rakin, ew ê jî sibê bi hemûya
civaka Îsraêl ve hêrs bibe! 19 Ger
erdên aidî we mindar bin, werin
erdên ku Perestgeha XUDAN lê
yî û aidî XUDAN e û di nava me
de ji xwe re milkan bistînin. Lê
belê ji xwe re, xeynî pêşkeşîgeha
Xwedayê me XUDAN, çêkirina
pêşkêşîgehekî din li XUDAN û
li me serî hilnedin. 20 Ma Akanê
lawê Zerah, îxanetê li tiştê ku ha-
tiye tirxan kirin, nekir? Û li ser
hemûya civaka Îsraêlê xezeb bû.
Û ew zilam di gunehê xwe de
tenê mehf nebû!
21 Û lawên Rûben û lawên Gad û
nêviya eşîra Manaşşe bi vî awayî
bersivê dan serezbetên Îsraêlê:
22 Xwedayê îlahan XUDAN, Xwe-
dayê îlahan XUDAN, ew dizane;
dê Îsraêl jî bizanibe. Ger me kirina
xwe, bona ku em îxanetê ji XUDAN
re bikin, an jî li dijrabûna wî kiribin,
tu (ya XUDAN), îro me xelas neke!
23 Ger me pêşkêşîgehê, bona ku em
dev ji li pêy çûna XUDAN bikin
û bona ku qewlên şewitandinê,
pêşkêşiyên zadî an jî bona ku qûr-
banên dilxweşiyê pêşkêş bikin û
çêkiribin, bila XUDAN ji me hi-
sabê wê bipirse! 24 Û gava me
vêya ava kirin, xema me ev bû:
Dibe ku lawên we, di demên werin
de ji lawên me re: Ma çi têkiliya
we bi Xwedayê Îsraêlê XUDAN re
heye? 25 Ya lawên Rûben û Gad,
XUDAN, Çemê Urdunê, di nava
me û we de sînor danî. Qet para
we di XUDAN de nîne! bibêjin,
dikarin bibin astengî ku lawên
me peristinê ji XUDAN re nekin.
26 Û bo vê yekê, me gotin ku em
ji xwe re pêşkêşîgehekê ava bikin.
Ne bona qewlên şewitandinê û
ne jî pêşkêşiya qurbanan, 27 lê di
nava me û we de û paşî me, di nav
nifşeyên me de, dê bibe şahde, da
ku, xizmeta XUDAN, bi qewlên
me yî şewitandinê, bi qurbanên me
û bi qewlên me yî dilxweşiyê ve li
ber wî bikin û bila lawên we sibê, ji
lawên me re nebêjin: Di XUDAN de
para we nîne! 28 Û em ûsa fikirîn:
Di demên pêşiyê de ji me, an jî ji
nîjadên me yên ku dê werin re, ger
tiştekî ûsa bibêjin, em ê jî: Li mîna-
ka pêşkêşîgeha ku bapîrên me bona
XUDAN çêkiribûn binêrin bibêjin:

Vêya ne bona qewlên şewitandinê
an jî pêşkêşiya qurbanê ye; lê vêya
şahdeya yekitiya di nava me û we
de yî ye! 29 Li dijî XUDAN rabûn,
îro dev ji li pêy çûna XUDAN
kirin, bona qewlên şewitandinê,
pêşkêşiya zad an jî pêşkêşiya qur-
bana ji bilî pêşkêşîgeha Xwedayê
me XUDAN, ji bilî pêşkêşîgeha
ku li ber Perestgeha wî yî, ava
kirina pêşkêşîgehekî din bila ji
me dûr be!
30 Û kahîn Pînehas û serokên
civakê yên ku bi wî re bûn, yanê
serezbetên Îsraêlê, gava gotinên
lawên Rûben û lawên Gad û lawên
Manaşşe bihîstin, dilxweş man.
31 Û li ser vêya, Pînehasê ku lawê
kahîn Eleazar e ji lawên Rûben û
lawên Gad û lawên Manaşşe re
got: Niha em dizanin ku XUDAN
di nava me de yî. Ji ber ku we
îxanetê li XUDAN nekirin û niha
we lawên Îsraêl ji destên XU-
DAN xelas kirin. 32 Û Pînehasê
lawê kahîn Eleazar û serokan, ji
erdên Gîleadê yên ku lawên Rû-
ben û lawên Gad lê ne, vegeriyan
erdên Kenanê cem lawên Îsraêl û
tiştên bûne û qediyane ji wan re
gotin. 33 Û ev tişt di çavên lawên
Îsraêl de qenc hate xuya kirin û
lawên Îsraêl Xwedê bilindtir ki-
rin. Carekî din jî qala bi ser erdên
ku lawên Rûben û lawên Gad lê
dijîn meşînê, bi wan re şer kirin
û şewitandin û xerakirina wir ne-
kirin. 34 Û lawên Rûben û lawên
Gad, bi gotina: Ev pêşkêşîgeh, di
nava me û we de şahdeye ku XU-
DAN, Xwedê ye! navê: Şahid li
pêşkêşîgehê kirin.

*Axaftina Yêşû ya xatir xwestinê*
5.Mûs 11,1-28; 30,15-20; 1.Dîr 28,8

23 Û dema XUDAN Îsraêl, ji
hemû neyarên ku li dora wê
ne xelas kir û gîhand dilxweşiyê;
di navberê de demekî dirêj der-
bas bûbû. Û dema Yêşû, kal bûbû
û temena wî jî zehf pêş ve çûbû.
2 Bo vê sedemê Yêşû, pêşhatiyan,
serezbetan, dadrês û wezîfedaran,
hemûya gelê Îsraêl civand. Û ji
wan re got: Ez kal bûm, temena
min zehf pêş ve çû[1]. 3 We dîtin ku
Xwedayê we XUDAN, bo qenciya
we, ji hemûya van netewana re çi
kir. Ji ber, yê ku bona we şer dikir,
Xwedayê we XUDAN bû. 4 A vay,
min tevî erdên neteweyên tune ki-
rine, yên ku ji Çemê Urdunê, heta
behra mezin ya ku li rojhilatê ye,
erdên neteweyên din jî bi pişkê ve
di nava eşîrên we de bi mêrasî par
kirin. 5 Û Xwedayê we XUDAN,
van neteweyan ji ber we ve bi-
pejiqîne û bajo. Û mîna Xwedayê
we XUDAN sozê daye we, hûn
ê erdên wan ji xwe re bikin milk.
6 Bona cîhanîn û parastina her
tiştên ku di Pirtûka Zagonê ya Mûsa

1 An jî: Buhurî.

de hatine nivîsandin, zehf xwurt
bin. Da ku, ji wan bi çep û rast ve
neçewtin. 7 Bila qet têkiliya we, bi
neteweyên ku di nava we de mane
re çênebe û navê îlahên wan di bîra
xwe de neynin û ji kesekî re, bi navê
wan ve sondê nedin xwarin û qûliti-
yê ji wan re nekin û ji wan re peris-
tinê nekin! 8 Mîna ku we heta îro
çêkirin, bi zexmî bi Xwedayê xwe
XUDAN re girêdayî bimînin. 9 Ji
ber ku XUDAN, neteweyên mezin
û xwurt ji ber we ve ajot. Û heta îro
yekê jî hêz neanîn ku li ber we bi
xwe bigirin. 10 Dê yekî ji we, berra
hezar kesî bide. Ji ber ku Xwedayê
we XUDAN, mîna ku ji we re goti-
ye, dê li dêvila we şer bike. 11 Bona
wê, zehf bala xwe bidin û ji Xwe-
dayê xwe XUDAN hez bikin! 12 Ji
ber ku, ger hûn pişta xwe li wî bizi-
virînin, bi neteweyên ku sax mayîne
û di nava we de dijîn re yek bibin û
ger qîzan bidin wan û ji wan qîzan
bistînin û bi wan re rûnin û rabin,
13 baş bizanibin ku dê Xwedayê
we XUDAN êdî van netewena ji
ber we ve neajo. Û hûn, heta ku ji
van erdên xweşik yên ku Xwedayê
we XUDAN daye we tune bibin,
van netewena dê bona we dafik,
feq û di pişta we de qamçî û di ça-
vên we de bibin strî[1].
14 A vay, mîna her mirovî, ez jî li
ber ji vê dinê koç kirin û çûnê me.
Hûn bi hemû hebûn û dilên xwe
ve dizanin ku, yek jî ji gotinên ku
Xwedayê we XUDAN daye we,
vala derneket û gişt jî hatin cîh,
yê ku vala derket çênebû. 15 Û dê
wusa bibe ku çawa hemû gotinên
qenc yê Xwedayê we XUDAN ji
we re gotiye, dê di derheqê we de
bibe hatibin cîh, heta xerabiyên ku
Xwedayê we XUDAN we ji ser
van erdê qenc yê ku daye we, tune
bike qala wan kiriye, hemûyê tiştên
xerab jî dê ûsa bîne serê we. 16 Ger
hûn peymana ku Xwedayê we XU-
DAN bi emir daye we xera bikin û
herin ji îlahên din re qûlitiyê bikin
û bi wan re biperistin û dê hêrsa
XUDAN li hemberî we sor bibe;
hûn ê bi lezî ji vî welatê xweşik, yê
ku wî daye we tune bibin û herin.

*Peymana ku li Şekemê tête nûkirin*

Neh 9,7-15; 5.Mûs 4,32-40; 32,7-14

24 Û Yêşû hemû eşîrên Îsraêl
li Şekemê civand û bona ku
herin cem wî, bangî pêşhatiyên Îs-
raêl û serezbetan û dadrês û wezîfe-
daran kir. Û li ber Xwedê sekinîn.
2 Û Yêşû ji hemûya gel re bi go-
tina: Xwedayê Îsraêl XUDAN ûsa
dibêje, dest bi axaftina xwe kir:
Têrahê bavê Birahîm û bavê Nahor
û bapîrên we yên din di demên ke-
vin de ji çemê Feratê wê de dijiyan
û qûlitiyê ji îlahên din re dikirin.
3 Lê belê min bapîrê we Birahîm ji
aliyê dinî çem rahişt û di hemûya

[1] Kelem, histrî.

erdên Kenanê ve gerand; nîjada wî
zêde kir û Îshaq dam wî. 4 Aqûp û
Esav jî dam Îshaq. Bona ku ji xwe
re milk bike, min herêma çiyayî
ya Seîrê, ji Esav re bexşandin. Lê
Aqûp û lawên wî jî çûn Misirê.
5 Û li pêy, Mûsa û Harûn şandim.
Û min bi kirinên xwe yî li nava Mi-
sirê li wê xistin û paşê we derxistin.
6 Û bapîrên we ji Misirê derxistim
û hûn hatin cem behrê. Û Misiriyan
tevî erebeyên şer û siwarên xwe,
heta Behra Gewez[1] berra bapîrên
we dan. 7 Û gava wan feryadê ji
XUDAN re kirin, di nava we û Mi-
siriyan de tariyê daxist. Û behrê bi
ser wan ve anî û wan nuxumandin.
Û we kirinên minî li Misirê, bi ça-
vên xwe ve dîtin. Û demekî dirêj
hûn li çolê rûniştin. 8 Dawiyê, min
we birin erdên Amoriyan, yên ku ji
Çemê Urdunê wê de dijîn. Û dema
li hemberî we şer kirin, min wan dan
destên we û we erdên wan ji xwe re
kirin milk û min wan ji ber we tune
kirin. 9 Balakê lawê Sîpporê qiralê
Moabê, dema bona ku li hemberî
Îsraêl şer bike amadekariyê dikir
û nûçeyê şand û bona ku naletê li
we bike, bangî Balamê lawê Beor
kir. 10 Lê belê min, guhdarî kirina
Balam red kir. Û wî jî dîsa bi dîsa
we pîroz kir; bi vî awayî, min we
ji destê wî xelas kir. 11 Û dawiyê
we Çemê Urdunê derbas kirin û ha-
tin Erîhayê. Û min Erîhayiyên ku li
hemberî we şer kirin, gelên Amo-
riyan, Perîziyan, Kenaniyan, Hîtîti-
yan, Gîrgaşiyan, Hîviyan û Yebûsi-
yan dan destê we. 12 Û mozên ku
min ji pêşiyê ve şandibûn, her du
qiralên Amorî ji ber we qewirandin.
Şûrê te an jî kevana te vî karî nekir.
13 Û bi vî awayî, min erdên ku we
keda xwe nedanê û bajarên ku we
ava nekirine dan we. Hûn li van de-
ran dijîn û ji 'zeytûngehên û rezên
ku we danenîne dixwin.
14 Û niha ji XUDAN ve bitirsin, ji
dil û dilsoziyê qûlitiyê ji wî re bikin
û îlahên ku bapîrên we li çemê Fe-
ratê wê de û li Misirê qûlitiyê ji
wan re dikirin bavêjin û ji XUDAN
re qûlitiyê bikin. 15 Û ger di çavê
we de ji XUDAN re qûlitî kirin ne
çê be, ka hûn ê ji îlahên ku bapîrên
we li çemê Feratê wê de qûlitiyê
jê re dikirin, an jî ji îlahên Amori-
yên ku hûn di erdên wan de dijîn re
qûlitiyê bikin, îro qirara xwe bidin.
Lê belê ez û maliyên xwe, em ê ji
XUDAN re qûlitiyê bikin!
16 Û gel, bi gotina: XUDAN ber-
dan û ji îlahên din re qûlitî kirin,
bila ji me dûr be! bersivê da. 17 Ji
ber, yê ku me û bapîrên me li Mi-
sirê ji koletiyê xelas kiriye û ji wir
derxistiye, yê ku wan mûcîzetên
mezin li ber çavên me çêkiriye, yê
ku di hemû rêwîtiya me de û di tû-
miya derbasbûna me yî di nav ne-
tewan de me parastiye, Xwedayê

[1] Binêrin 2:10

me XUDAN e. 18 Û XUDAN,
hemû neteweyên li vî welatî di-
jîn û yanê Amoriyan ji ber me ve
qewirand. Em ê jî ji XUDAN re
qûlitiyê bikin. Ji ber ku ew Xwe-
dayê me ye!
19 Û Yêşû got: Lê belê hûn ê nika-
ribin qûlitiyê ji XUDAN re bikin.
Ji ber ku, ew Xwedayek pîroz e,
Xwedayek çavnebar e. Dê li guneh
û sûcên we neborîne. 20 Ger hûn
dev ji XUDAN berdin û ji îlahên
biyan re qûlitiyê bikin, wî çawa ku
berê qencîtiyê ji we re kiribû, dê
vê gavê li dijî we bizivire, we rastî
bêtarê bîne û tune bike.
21 Û gel, bi gotina: Na! Em ê ji
XUDAN re qûlitiyê bikin, bersivê
dan Yêşû.
22 Wê gavê, Yêşû ji gel re got:
Hûn bi xwe şahde ne ku bona
qûlitî kirinê, we XUDAN hilbi-
jart. Belê, em şahde ne! gotin.
23 Û Yêşû got: Wê gavê îlahên
biyan, yên niha di nav we de ne
bavêjin. Dilên xwe bidin Xwe-
dayê Îsraêl XUDAN!
24 Û gel, bi gotina: Em ê qûliti-
yê ji Xwedayê xwe XUDAN re
bikin û gotina wî guhdarî bikin!
bersivê dan.
25 Û Yêşû wê rojê li Şekemê bi
gel re peymanekê çêkir. Bona
wan sereta û qaîdeyan nîşan da.
26 Û Yêşû, vana derbasî Kitêba
Zagonê ya XUDAN jî kir. Û da-
wiyê, kevirek mezin rahişt û di
bin darçiloya ku li cem Perestge-
ha XUDAN de bû, çikand. 27 Û
Yêşû ji hemûya gel re got: A vay,
bila ev kevir ji me re bibe şahid. Ji
ber, vî hemû gotinên ku XUDAN
ji me re gotibû, bihîst. Ger hûn
Xwedayê xwe înkar bikin, dê ev
kevira li dijî we şahdeyiyê bike!

*Mirina Yêşû*

28 Û li pêy vêya, Yêşû her kesî
şand erdên ku bi mêrasî girtibûn.
29 Û wusa bû ku, qûlê XUDAN
Yêşûyê lawê Nûn, paşî van tiştan
di sed û deh saliya xwe de mir[1].
30 Û wî li Tîmnat-Seraha ku di
nava sînorên mêrasa wî de dimî-
ne, li bakurê çiyayê Gaaşa ku li
herêma çiyayî ya ku li Efrayîm e
binerd kirin. 31 Û Îsraêl, di tûmi-
ya jiyana Yêşû de û li pêy Yêşû,
heta ku serokên kalepîr ên dijîn û
yên ku bi her tiştên ku XUDAN
bona Îsraêl çêkiriye dizanin, qûli-
tiyê ji XUDAN re kirin.
32 Û hestiyên Ûsiv yên ku lawên
Îsraêl ji Misirê derxistibûn, li
Şekemê li para zeviya ku Aqûp ji
lawên Hamorê bavê Şekem bi sed
parîkên zîv stendibû binax kirin.
Û ew bû mêrasa lawên Ûsiv.
33 Û gava Eleazarê lawê Harûn
mir, wî di gira li herêma çiyayiya
Efrayîm û ya ji lawê wî Pînehas re
hatiye dayîn de binerd kirin.

[1] An jî: Çû ser dilovaniya xwe.

# SERWERAN

*Pêşgotin*

Pirtûka Serweran ji bûyerên di derbarê demên bela wela, yên ku di navbera dema gelê Îsraêlê pirraniya erdên Kenanê bi dest ve xistiye û dema ber ve qiraletiya Îsraêlê ve diçe de pêk tê, dibêje. Ev bûyeran, kirinên lehengên ku pêşhatiyên gel in û bi navê: "Serweran" têne binav kirin, tîne ziman.

Daxuyaniyek girîng ya pirtûkê heye: Li ser pêlan mayîna gelê Îsraêle, bi dilsozî û girêdana wanî Xwedê ve têkildar e; bêîtaetiyên wan her tim bêtariyê aniye. Lê belê Xwedê her tim bona xelasiya gelê ku tobe bike û berê xwe bide wî, amade ye.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:9 | Bûyerên heta mirina Yêşû bûyine |
| 2:10-16:31 | Serwerên Îsraêlê |
| 17:1-21:25 | Bûyerên cûr be cûr |

*Şerê bi Kenaniyan re*

1.Mûs 49,8-9

1 Û paşî mirina Yêşû wusa bû
ku, lawên Îsraêl ji XUDAN re
pirsîn û gotin: Ma bona ku em li dijî
Kenaniyan cengê bikin, dê kî bona
me derkeve pêşiyê? 2 Û XUDAN
got: Dê Cihûda derkeve; a vay,
welêt dam destê wî. 3 Û Cihûda
ji birayê xwe Şîmeûn re got: Tevî
min derkeve hêsseya ku ketiye para
min û em li dijî Kenaniyan cengê
bikin û ez ê jî tevî te herim hêsseya
ku ketiye para te. Û Şîmeûn tevî wî
çû. 4 Û Cihûda derket û XUDAN
Kenaniyan û Perizziyan dan destê
wan û di Bezekê de ji wan li deh
hezar kesî xistin. 5 Û di Bezekê
de Adonî-Bezek dîtin û li dijî wî
cengê kirin û li Kenanî û Perizziyan xistin. 6 Lê belê Adonî-Bezek
reviya û li pêy wî bera wî dan û bi
wî girtin û serî tiliyên dest û lingên
wî jêkirin. 7 Û Adonî-Bezek got:
Heftê qiral, bi serî tiliyên dest û
lingên wan jêkirîbûnê di bin sifra
min de xwarinê dan hev; her çawa
kiribim, Xwedê jî bi vî awayî li
min vegerand. Û wî anîn Orşelîmê
û li wir mir.

8 Û lawên Cihûda, li hember
Orşelîmê cengê kirin û wê girtin û
ji şûr ve derbas kirin[1] û agir bi bajêr
ve xistin. 9 Û li pêy wê lawên Cihû-
da, bona ku li dijî Kenaniyên ku li
çiyayiyê û li Başûrê[2] û li Şefelayê
rûdinin cengê bikin daketin.
10 Û Cihûda li dijî Kenaniyên ku
li Hebronê rûdinin meşiya û navê
Hebronê, berê Kîryat-Arba bû û li
Şeşa û li Ahîman û li Talma xist.
11 Û ji wir, li hember gelên Debîrê
meşiya. Lê navê Debîrê yê kevin
Kîryat-Sefer bû. 12 Û Kaleb got:
Her kî ku li Kîryat-Seferê bixe û
wê bigire, ez ê qîza xwe Aksa bi
jinitî bidim wî[3]. 13 Û Otniyêlê
lawê Kenazê birayê biçûk yê Ka-
leb girt û qîza xwe Aksa bi jinitî da
wî. 14 Û wusa bû ku, dema pîrek
pê re zewicî, bona ku ji bavê xwe
zeviyekê bixwaze, wê teşwîq kir û
pîrek ji kerê xwe ve daket û Kaleb
jê re got: Çiyî te heye? 15 Û pîrekê
jê re got: Xelatekê bide min; ma-
dem ku te min danî warê rojhilatê,
çavkaniyên avê jî bi min de. Û Ka-
leb çavkaniyên jorîn û çavkaniyên
jêrîn dan wê.
16 Û lawên Kenî ên xezûrê Mûsa,
ji bajarê darên xurme, tevî lawên
Cihûda derketin çola Cihûda ya ku
li rojhilata Aradê yî û çûn û tevî
netewê rûniştin. 17 Û Cihûda, tevî
birayê xwe Şîmeûn çû û li Kena-
niyên ku li Tsefatê rûdinin xistin
û wê bi tûmî tune kirin. Û navê
Horma li bajêr kirin. 18 Û Cihûda
Gaza û sînorên wê û Aşkalonê û
sînorên wê û Ekronê û sînorên wê
girt. 19 Û XUDAN bi Cihûda re
bû û gelên çiyayiyê qewirandin; ji
ber, hêz neanî ku yên li geliyê rû-
dinin biqewirînin, ji ber ku erebe-
yên wan ên hesin ên cengê hebûn.
20 Û mîna ku Mûsa gotibû, Heb-
ronê dan Kaleb û her sê lawên
Anak ji wir qewirandin. 21 Û
lawên Benyamîn, Yebûsiyên ku li
Orşelîmê rûdinin neqewirandin û
Yebûsî, heta îroj tevî lawên Ben-
yamîn li Orşelîmê rûdinin.
22 Û mala Ûsiv, ew jî derketin
Beytelê û XUDAN bi wan re bû.
23 Û mala Ûsiv, bona ku sîxuri-
yê li Beytelê bikin zilam şandin.
Lê navê bajêr berê Lûz bû. 24 Û
çavnêrîder, zilamek ku ji bajêr ve
derdikeve dîtin û jê re gotin: Em
rica dikin, cîhê ku em têkevin ba-
jêr nîşanî me bide û em ê li hember
te bi qenciyê bikin. 25 Û cîhê ku
bikevin bajêr nîşanî wan da û bajêr
dan ber devê şûr; lê belê wî zilamî
û hemûya malbata wî berdan.
26 Û zilam çû welatê Hîttiyan û
bajarek ava kir û navê Lûzê lê kir;
heta îrojê navê wê ev e.

1 Dan ber devê şûrê.
2 Bi Îbranîtî Negeb, aliyê başûrê Cihûdayê ye.
3 Yanê bona ku pê re bizewice, bidim wî.

27 Û Manaşşe, gelên Beyt-Şeanê
û navçeyên wê û gelên Taanak û
navçeyên wê û gelên Dor û nav-
çeyên wê û gelên Megîddo û nav-
çeyên wê neqewirandin û Kenanî,
bona ku li van bajaran rûnin, li
berxwe dan. 28 Û wusa bû ku,
dema Îsraêl xwurt bû Kenaniyan
kirin suxrekar û bitûmî wan neqe-
wirandin.
29 Û Efrayîm, Kenaniyên ku li
Gezerê rûdinin neqewirandin; lê
belê Kenanî li Gezerê di nav wan
de rûniştin.
30 Zebûlûn gelên Kîtron û gelên
Nahalol neqewirandin û Kena-
nî di nav wan de rûniştin û bûn
suxrekar.
31 Aşer gelên Akko û gelên
Sayda û Ahlab û Akzîb û Helba
û Afîk û Rehobê neqewirandin
32 û Aşerî di nav gelên welêt Ke-
naniyan de rûniştin; ji ber ku wan
neqewirandin.
33 Naftalî gelên Beyt-Şemeşê û
gelên Beyt-Anatê neqewirandin
û di nava gelên welêt Kenaniyan
de rûniştin; lê belê gelên Beyt-
Şemeşê û yên Beyt-Anatê bûn
suxrekar.
34 Û Amorî lawên Dan berbi
çiyayiyê ve ajotin; ji ber ku, bona
daketina deştê nedihiştin 35 û
Amorî bona ku li çiyayê Heresê,
li Ayyalonê û li Şaalbîmê rûnin
li ber xwe dan; lê belê destê
mala Ûsiv xwurt bû û ew bûn
suxrekar. 36 Û sînorê Amoriyan
ji kaşa Akrabbîmê, ji zinarê û
berbi jor bû.

*Milyaketê Xudan bi Îsraêliyan ve dipeke*

2 Û milyaketê XUDAN ji Gîl-
galê derket Bokîmê. Û got:
Min we ji Misirê derxistin û
anîn ev welatê ku sondê dabûm
bapîrên we û gotim: Ez ê peyma-
na xwe ya ku bi we re yî, abadîn
xera nekim 2 û divê hûn bi gelên
vî welatî re peymanê nekin; hûn ê
pêşkêşîgehên wan xera bikin. Lê
belê we gotina min guhdarî neki-
rin; ma we çima wusa kirin? 3 Ji
ber vê yekê jî gotim: Ez ê wan ji
ber we neqewirînim û bona we,
dê di sînga we de bibin stirî û dê
îlahên wan, bona we bibin dafik.
4 Û wusa bû ku, dema milyaketê
XUDAN, hemûyên van gotinan
ji lawên Îsraêl re gotin, netewe bi
dengekî bilind giriyan. 5 Û navê
Bokîm[1] li wir kirin û li wir qur-
banê ji XUDAN re serjê kirin.

*Mirina Yêşû*

6 Û dema Yêşû netewê berda,
bona ku lawên Îsraêl welêt ji xwe
re bikin milk, her kes çûn mêrasa
xwe. 7 Û di hemû rojên Yêşû de û
di rojên kalepîrên ku li pêy Yêşû
zindî mane û hemû karên mezin
ên ku XUDAN bona Îsraêlê ki-

1 Yên ku digirîn.

rine dîtine de, netewe qûlitiyê ji
XUDAN re kirin. 8 Û qûlê XU-
DAN, Yêşûyê lawê Nûn di sed û
deh salî bûnê de mir[1]. 9 Û wî li
bakurê çiyayê Gaaşê, di çiyayi-
ya Efrayîmê, li Tîmnat-Heresê, li
hundirê sînorê wî de binax kirin.
10 Û hemûya ew nifşe jî beşdarî
bapîrên xwe bûn û nifşeyek din,
ya bi XUDAN û bi karê ku bona
Îsraêlê kiriye ve nizanin afirîn.

*Îsraêlî ji Xwedê ve dûr dikevin*

5.Mûs 6,10-15; Zeb 106,34-36; Neh 9,27

11 Û lawên Îsraêl, ya ku di
çavên XUDAN de xerab e kirin
û ji Baalan re qûlitiyê kirin
12 û dev ji Xwedayê Bapîrên xwe
XUDANê ku wan ji welatê Misirê
derxistiye, berdan û li pêy îlahên
din, ên ku ji îlahên neteweyên li
dora wan in meşiyan û ji wan re
xwar bûn û XUDAN bi hêrs kirin.
13 Û XUDAN berdan û ji Baal
û Astartiyan re qûlitî kirin. 14 Û
hêrsa XUDAN, li dijî Îsraêlê sor bû
û wan da destên talankeran û wan
talan kirin û wan firotin neyarên li
dorê ne û êdî li ber neyarên xwe
hêz neanîn ku bisekinin. 15 Her bi
ku derê ve hilkişiyabin, mîna ku
XUDAN ji wan re gotibû û mîna
ku XUDAN sondê dabû wan,
destê XUDAN li dijî xerabiyê li
hember wan bû û zehf aciz bûn.
16 Û XUDAN serwerên ku wan
ji destên talankeran xelas bike
derxistin. 17 Û serwerên xwe jî
guhdarî nekirin; ji ber ku li pêy
îlahên din zinê kirin û ji wan re
xwar bûn, zû ji rêya ku bapîrên
wan dimeşiyan ve çewt bûn; wan
emirên XUDAN guhdarî dikirin,
lê belê vana mîna bapîrên xwe ne-
kirin. 18 Û her ku XUDAN bona
wan serweran derxistin, XUDAN
bi serwer re dibû û di tûmiya ro-
jên serwer de wan ji destê neyarên
wan xelas dikir; ji ber, ji ber yên
ku tahdê li wan dikin û tengasi-
yê didin wan nalînên wan, heyfa
XUDAN bi wan dihat. 19 Û wusa
bû ku, her ku serwer mir, şunda
zivirîn û bi qûlitî kirina ji îlahên
wekî din re û bona ku ji wan re
xwarbûnê ve li pêy wan çûnê, ji
bapîrên xwe zêdetir xera bûn; dev
ji karên xwe û ji rêyên xwe yî in-
yadê ber nedan. 20 Û hêrsa XU-
DAN li dijî Îsraêlê sor bû û got:
Madem ku ev netewe, peymana
ku ji bapîrên wan re emir dabûm,
xera kirin û gotina min guhdarî
nekirin; 21 ez jî êdî qet netewe-
yên ku dema Yêşû mir berda bûn,
ji ber wan naqewirînim; 22 da
ku, ka dê mîna bapîrên xwe bona
meşê bi rêya XUDAN ve bigirin,
an jî negirin, ez ê bi vana Îsraêlê
biceribînim! 23 Û XUDAN, wan
neteweyan bi lezî neqewirand û
berda û wan neda destê Yêşû.

---
[1] Yanê çû ser heqiya xwe.

*Kenaniyên ku li welêt mane*

Yêşû 13,1-6; Serw 2,20-23; 1.Kor 15,33

3 Neteweyên ku bona yên bi
Îsraêlê û hemû cengên Kena-
nê nizanin, giştikan bi wan re bi-
ceribînin 2 û tenê bila nifşeyên
lawên Îsraêl, qet nebe yên ku ji
berê ve bi cengan nizanin, bona ku
hînî cengê bibin zanîna wan he-
bin, XUDAN hiştibû ev in: 3 Pênc
begên Filistiyan û hemûyên Ke-
naniyan û Saydayiyan û ji çiyayê
Baal-Hermonê, heta cîhê ketina
Hamatê, Hîviyên ku li çiyayên
Lubnanê rûdinin. 4 Û bona zanîna,
ka dê bi emirên XUDAN ên ku bi
navdîtiya Mûsa ve ji bapîrên wan
re hatine emir kirin guhdarî bikin
an nekin, wan û Îsraêliyan bice-
ribînin hatin berdan. 5 Û lawên
Îsraêl di nava Kenaniyan, Hîttiyan
û Amoriyan û Perîzziyan û Hîvi-
yan û Yebûsiyan de rûniştin 6 û ji
xwe re bi jinitî qîzên wan stendin
û qîzên xwe dan lawên wan û ji
îlahên wan re qûlitiyê kirin.

*Otniyêl*

Serw 2,10-16; Pey 3,19

7 Û lawên Îsraêl, tiştên ku di çavê
XUDAN de xerab e kirin û Xwe-
dayê xwe XUDAN ji bîr kirin û ji
Baalan û ji Aşeran re qûlitiyê ki-
rin. 8 Û hêrsa XUDAN li hember
Îsraêlê sor bû û wan ji qiralê Me-
zopotamya Kuşan-Rîşatayim re
firotin û lawên Îsraêl heyşt sal ji
Kuşan-Rîşatayim re qûlitiyê kirin.
9 Û gava lawên Îsraêl hawarê ji
XUDAN re kirin, XUDAN bona
lawên Îsraêl xelaskerekî, Otniyêlê
lawê Kenazê, birayê biçûk yê Ka-
leb derxist û wî jî wan xelas kir.
10 Û Ruhê XUDAN hate ser wî
û XUDAN, qiralê Mezopotamya
Kuşan-Rîşatayîm da destê wî û
destê wî li dijî Kuşan-Rîşatayîm
xwurt bû. 11 Û welat çel sal rehet
kir. Û Otniyêlê lawê Kenaz mir.

*Ehûd*

12 Û lawên Îsraêl, dîsa tiştên ku
di çavê XUDAN de xerab e kirin
û XUDAN li dijî Îsraêlê qiralê
Moabê Eglon xwurt kir, ji ber,
tiştên ku di çavê XUDAN de xe-
rab e kiribûn. 13 Û lawên Ammon
û Amalek li cem xwe civandin û
çû û li Îsraêlê xist û bajarê darên
xurmê stendin. 14 Û lawên Îsraêl
hîjdeh sal qûlitiyê ji qiralê Moabê
Eglon re kirin.
15 Lê belê dema lawên Îsraêl ha-
warê ji XUDAN re kirin, XUDAN
bona wan xelaskerek, Ehûdê lawê
Genayê Benyamînî ye û zilamekî
çepok e derxist. Û lawên Îsraêl,
bi destê wî xeracê ji qiralê Moabê
Eglonê re şandin. 16 Û Ehûd bona
xwe qamayekî di dirêjiya gezekî[1] de
û bi dudevî çêkir û wê li ser kema-
xa xwe yî rastê, di bin kincên xwe

1 Li rasteka menan binêrin.

de dakir. 17 Û xeracê pêşkêşî qiralê
Moabê Eglon kir û Eglon zilamekî
herî qelew bû. 18 Û wusa bû ku,
dema pêşkêşîkirina xeracê qedand,
zilamê ku xeracê kişandine şandin.
19 Lê belê ew bi xwe ji ocaxên ke-
viran ên ku li cem Gîlgalê ne şunda
zivirî û got: Ya qiral! gotinek minî
bi dizîka ji te re heye. Û: Hiş be!
got. Û hemûyên ku li cem rûdiniştin
derketin derve. 20 Û Ehûd hate cem
wî û qiral li odeya xwe ya hênik
ya jorîn, tena serê xwe rûdinişt. Û
Ehûd got: Ji Xwedê ve gotinek min
ji te re heye. Û ji kursiya xwe rabû.
21 Û Ehûd destê xwe yî çepê dirêj
kir û bi kemaxa xwe yî rastê qama
xwe kişand û wê di zikê qiral ve çi-
kand 22 û paşî kêrê destik jî ketiyê
û bez bi dora serî girt, ji ber ku qa-
mayê ji zikê wî nekişand û ji paş wî
ve derket. 23 Û Ehûd derket sefikê
û li pêy xwe, deriyên odeya jorîn
girtin û nifte[1] kirin.
24 Û gava ew derket, qûlên qiral
hatin û nihêrtin û a vay, deriyên
odeya jor niftekirî bûn û gotin:
Muheqeq li oda jorîn lingên xwe
duxumîne. 25 Û heta ku aciz bûn
man û a vay, deriyên odeya jorîn
venekir û niftê rahiştin û vekirin û
a vay, efendiyê wan bi mirîtî ke-
tibû erdê.
26 Û gava ew li bendê bûn, Ehûd
reviya û ocaxên keviran derbas kir
û reviya Seîrayê. 27 Û wusa bû
ku, dema hat, li çiyayiya Efrayîmê
borî hatin lêxistin û lawên Îsraêl
tevî wî ji çiyayiyê daketin û ew
li pêşiya wan bû. 28 Û ji wan re
got: Li pêy min werin; ji ber ku
XUDAN neyarên me, Moabiyan
dan destê me! Û li pêy wî dake-
tin û li dijî Moabiyan, buhurkên
Urdunê girtin û tu kesî derbas
nekirin. 29 Û di wê wextê de ji
Moabê, zilamên her yekê xwurt û
her yekê egîd in, li qasî deh he-
zar kesî xistin û tu kes xelas nebû.
30 Û Moab di wê rojê de, di bin
destê Îsraêlê de nizm bû. Û welat
heyştê sal aramiyê dît[2].

*Şamgar*

31 Û li pêy wî, Şamgarê lawê
Anat hat û bi mesasa ganêran ji
Filistiyan li şeş sed kesî xist û wî
jî Îsraêlê xelas kir.

*Debora*

1.Sam 12,9-11

4 Û dîsa lawên Îsraêl tiştên ku
di çavê XUDAN de xerab e
kirin û Ehûd miribû. 2 Û XUDAN
wan ji qiralê Kenanê Yabînê ku li
Hatsorê qiraletiyê dike re firot û
serokê artêşa wî Sîsera bû û ew bi
xwe li Haroşet-Goyîmê rûdinişt.
3 Û lawên Îsraêl, feryadê ji XU-
DAN re kirin, ji ber ku neh sed

[1] Kilît.

[2] Rehet kir.

erebeyên wî yên cengê ên he-
sinî hebûn û bîst salî pirr tahde li
lawên Îsraêlê kir.
4 Û di wê demê de, jina Lappî-
dot, peyxamber Debora serweriyê
li ser Îsraêlê dajot. 5 Û pîrek di
çiyayiya Efrayîm de, di navbera
Rama û Beytelê de, di binya dara
xurmeya Deborayê de rûdinişt
û lawên Îsraêl, bona daraziyê
hildikişiyan cem wê. 6 Û şand û
ji Kadeş-Naftaliyê bangî Barakê
lawê Abînoam kir û jê re got: Ma
Xwedayê Îsraêlê XUDAN, bi
gotina: Here û ji lawên Naftalî û
ji lawên Zebûlûn deh hezar kesî
bigire cem xwe û bikişîne çiyayê
Teborê emir neda? 7 Û ez ê Sî-
serayê serokê artêşa Yabîn û ere-
beyên wî yên cengê û leşkerên wî
bikişînim çemê Kîşonê, cem te û
ez ê wî bidim destê te. 8 Û Barak
jê re got: Ger tu bi min re were,
ez ê jî herim; na, ger tu bi min re
neyê, ez narim. 9 Û Debora got:
Muheqeq ez ê bi te re herim; lê di
rêya ku tuyê tê de here, dê şeref ne
ji te re be; ji ber ku XUDAN, dê
Sîsera bide destê pîrekekê. Û De-
bora rabû û tevî Barak çû Kedeşê.
10 Û Barak Zebûlûn û Naftalî li
Kedeşê civandin û deh hezar kes
li pêy wî derketin û Debora jî tevî
wî hilkişiya.
11 Û Kenî Heber, ji lawên Ho-
babê ku xezûrê Mûsa bû, ji Keni-
yan cihê veqetiyabû û heta darçi-
loya ku li Tsaanannîma ku li cem
Kedeşê yî çadira xwe danî bû.
12 Û derketina Barakê lawê Abîno-
amî ku derketiye çiyayê Taborê,
ji Sîsera re gîhandin. 13 Û Sîse-
ra hemû erebeyên xwe yî cengê,
neh sed erebeyên hesinî û hemû
netewa ku tevî wî ne, ji Haroşet-
Goyîmê, li çemê Kîşonê civandin.
14 Û Debora ji Barak re got: Rabe,
ji ber roja ku XUDAN Sîsera daye
destê te ev roj'e; ma XUDAN li ber
te derneket? Û Barak, tevî deh he-
zar kesên ku li pêy wî ne, ji çiyayê
Taborê daket. 15 Û XUDAN Sîse-
ra û hemû erebeyên wî yên cengê
û hemû artêşa wî li ber Barak, da
ber devê şûrê û xera kir û Sîsera
ji erebeya xwe yî cengê daket û
bi peyatî reviya. 16 Û Barak, heta
Haroşet-Goyîmê bera pêy erebe-
yên cengê û bera pêy artêşê da û
hemû artêşa Sîsera, bi devê şûr ve
ketin; tenê kesek jî nema.
17 Lê belê Sîsera, bi peyatî revi-
ya çadira Yael a pîreka Kenî He-
berê; ji ber ku di navbera Yabînê
qiralê Hatsorê û mala Kenî Heber
de aşitî hebû. 18 Û Yael, bona ku
pêrgîniyê ji Sîsera re bike derket
û jê re got: Vegere efendiyê min,
vegere cem min; metirse! Û ve-
geriya cem wê, çadirê û pîrek bi
lihêfekê wî nuxumand. 19 Û jê re
got: Ez rica dikim, hinek avê bide
min ku ez vexwim; ji ber ku ez tî
bûme. Û hebana şîr vekir û pê da

vexwarin û wî nuxumand. 20 Û ji
pîrekê re got: Li ber devê çadirê
bisekine û dê wusa bibe, ger zila-
mek were û ji te re bipirse û: Gelo
tu kes li vir heye? bibêje; tuyê:
Na! bibêje. 21 Û Yael a jina Heber
singê çadirê rahişt û nîrkut di des-
tê xwe de girt û hêdîka ket cem
wî û singê bi cênîgên wî ve kuta
û heta ku sîng bi erdê ve çû, tê de
rabû; ji ber ku ew di xewa kûr de
û bêhal bû û mir. 22 Û a vay, gava
Barak bera Sîsera dida, Yael bona
pêrgîniya wî derket û jê re got:
Were û ez zilamê ku tu lê digerî
nîşanî te bidim. Û hat cem pîrekê
û a vay, Sîsera bi mirîtî radiket û
sing di cênîgên wî de bûn.
23 Bi vî awayî, wê rojê Xwedê,
Yabînê qiralê Kenanê li ber lawên
Îsraêl nizm kir. 24 Û heta ku lawên
Îsraêl, qiralê Kenanê Yabîn helaq
kirin, li dijî qiralê Kenanê Yabîn
destên wan her ku çû xwurttir bû.

*Murxa Deborayê*

5 Û ew roj Debora û Barakê
lawê Abînoam sitirandin û
gotin:
2 Ji ber ku serok li Îsraêlê se-
rokantiyê dikin, ji ber ku ne-
tewe ji dil xwe dan; XUDAN
pîroz bikin!
3 Ya qiralno; guhdarî bikin, ya
mîrno, guh bidin! Ez ê ji XUDAN
re, ez ê bistirêm; ez ê ji Xwedayê
Îsraêlê XUDAN re bi miqaman
bixwînim!
4 Ya XUDAN! gava tu ji Seîrê
derket, gava tu ji beyara Edomê
pêş ve çû, erd hejiya, ezman jî
dilop kirin; belê, ewran av dilo-
pandin[1].
5 Li ber XUDAN çiyayan, li wê
Sînayê, li ber Xwedayê Îsraêlê
XUDAN hejiyan.
6 Di rojên Şamgarê lawê Anat
de, di rojên Yaelê de, dawiya kar-
wanan qut bûn û rêwî di rêyên
çep de diçûn.
7 Li Îsraêlê dawiya serweran qut
bûbûn, heta ku ez bi dayikî li Îs-
raêlê rabûm, heta ku ez, Debora
rabûm, dawiya wan qut bûbûn.
8 Îlahên nû bijartin; wê gavê di
deriyan de ceng hebû! Li Îsraêlê,
di nava çel hezarî de, ma mertal
an jî rim hate dîtin?
9 Dilê min ji yên ku serweriyê ji
Îsraêlê dikine re, ji yên ku di nav
netewê de, xwe ji dil didine re ye;
XUDAN pîroz bikin.
10 Ya yên ku li kerê sipî siwar
dibin, ya yên ku li ser xalîçe-
yan rûdinin û ya yên ku di rê de
dimeşin, bibêjin!
11 Ji galegala yên ku tîran davêjin
dûrtir, li cîhên ku avê dikişînin,
li wir, karên XUDAN yên rast, li
Îsraêlê karên rast ên serweriya wî
dê bibêjin wê gavê netewa XU-
DAN daketin deriyan.

[1] Ewran dilopê avê kirin, an jî: Dilopê avê dan.

12 Hişyar be, ya Debora, hişyar
be! Hişyar be, hişyar be, qesîde-
yan bixwîne; rabe, ya Barak, ya
lawê Abînoam, dîlên xwe bibe!
13 Wê gavê yên maqûl û yên ku ji
ber netewê mane daketin; XUDAN
bona min, li dijî egîdan daket.
14 Ji Efrayîm, yên ku li Amalekê
reh danîne; li pêy te ya Benyamîn, di
nava zilamên te de; ên ku ji Makîrê
daraziyê didan û yên ku ji Zebûlûnê
çoyê serdar dikişînin daketin.
15 Û Îsşakar bi serokên xwe
Debora re bûn; Îsşakar her çawa
be, Barak jî wusa bû; li pêy
wî êrîşî geliyê kirin. Li cem
çemên Rûbenê, ji dil gengeşiyên
mezin çêbûn.
16 Ma tu çima di nava govan de,
bona guhdarî kirina bilûra ku ji
keriyan re tête lêxistin rûnişt?
Li cem çemên Rûbenê, ji dil
gengeşiyên mezin çêbûn.
17 Gîlead ji Urdunê wêdetir rûnişt
û ma çima Dan di keştiyan de ma?
Aşer li qeraxa behrê rawestiya û li
cem çemên xwe rûnişt.
18 Li cîhên bilind ên qadê Zebûlûn
û Naftalî, neteweyek ku canê xwe
davêjin bêtariya mirinê bûn.
19 Qiralan hatin û cengê kirin; li
Taanakê, li cem avên Megîddo,
wê gavê qiralên Kenanê cengê ki-
rin; pertala[1] zîvî ranehiştin.
20 Stêrkan ji ezmanan ve cengê
kirin, li dijî Sîsera ji destekên[2]
xwe ve cengê kirin.
21 Çemê Kîşonê, ew çemê mezin,
çemê Kîşonê wan maltin û birin. Ya
canê min, te quwetê girt bin lingan.
22 Wê gavê rabûna hespa ya li ser
du lingan, ji rabûna yên xwurtî
ser du lingan; neynûkên hespan
mohrê li erdê xistin.
23 Milyaketê XUDAN got: Na-
letê ji Meroz re bikin! Bi naletek
giran naletê li gelê wî bikin! Ji
ber ku nehatin alîkariya XUDAN,
li dijî egîdan nehatin alîkariya
XUDAN.
24 Yael a jina Kenî Heber, bila di
nava pîrekan de bi zêdeyî pîroz
be; di nava pîrekên çadirê de bi
zêdeyî pîroz be!
25 Avê xwest, Yael şîr da wî; bi
çoçika began dew pêşkêş kir.
26 Destê xwe li singê û destê xwe
yî rastê li nîrkutê karkeran re ber-
da û bi nîrkutê li Sîsera xist, serê
wî eciqand û şikestand û ji cênîkên
wî ve qul kir û derbas kir.
27 Lingên wî daketin binî, ket; di
cîhê ku lê rûniştîbû de bêcan ket.
28 Dayika Sîsera ji paş qefesê, ji
şivakê nihêrt û qêriya: Ma çima
erebeya wî yî cengê ewqasî bi gi-
ranî tê? Çima meşa erebeyên wan
dereng dimînin?
29 Pîrekên wê yên bihîkmet bersî-
vê dan wê û wê jî xwe bi xwe ber-

1 Yanê alav.

2 Palpiştên.

sivê da: 30 Bona her egîdî qîzek,
du qîz, bona Sîsera ji talanê kincên
bi boyax, ji talanê kincên bi boyax
yên ku hatine neqşandin, bi malê
talanê bona histuyê wî, kincên bi
boyax û her du aliyê ve hatine
neqşandin, ma qey mala talanê
nedîtin û li hev par nekirin?
31 Ya XUDAN, bila hemû neya-
rên te bi vî awayî tune bibin; lê
belê yên ku ji te hez dikin, bila
bibin mîna roja ku di hêza te de
derdikeve!
Û welat, çel sal kete aramiyê.

*Gîdeon*

6 Û Lawên Îsraêl ya ku di çavê
XUDAN de xerab e kirin û
XUDAN wan heft salî da des-
tên Midyanê. 2 Û li dijî Îsraêlê
destê Midyan xwurt bû û ji ber
Midyanê, lawên Îsraêl bona xwe
cîhên veşartinê ên li çiyê û şikeft
û bircan çêkirin. 3 Û wusa bû ku,
Îsraêl her ku zad çandin, Mid-
yaniyan û Amalekiyan û lawên
rojhilatê derdiketin û li dijî wan
derdiketin 4 û li dijî wan bicîh
dibûn û heta ku bigihêje Gaza,
zadê erdê xera dikirin û dixwaze
bila mîh be an jî bila ga be, bila
ker be, tu tiştekî xwedîkirinê[1] li
Îsraêlê nedihiştin. 5 Ji ber ku ew
bi heywan û çadirên xwe ve der-
diketin; bi pirranî, mîna kulliyan
dihatin; hejmara wan û deveyên
wan zêde bûn û bona xerakirina
welêt dihatin wir. 6 Û ji ber Mid-
yanê Îsraêl zehf nizm bû û lawên
Îsraêl qêrînê ji XUDAN re kirin.
7 Û wusa bû ku, dema ji ber Mid-
yanê lawên Îsraêl ji XUDAN
re qêriyan, 8 XUDAN peyxam-
berekî ji lawên Îsarêlê re şand û
ji wan re got: Xwedayê Îsraêlê
XUDAN wusa dibêje: Min we ji
Misirê derxist û we ji welatê ko-
letiyê[2] derxist 9 û we ji destê Mi-
siriyan û ji hemûyên ku tengasiyê
didin we ve azad kir û wan ji ber
we qewirand û welatê wan da we.
10 Û ji we re gotim: Ez Xwedayê
we XUDAN im; hûn ê ji îlahên
Amoriyên ku hûn li welatên wan
rûdinin netirsin. Lê belê we go-
tina min guhdarî nekirin!
11 Û milyaketê XUDAN hat û
di bin darçiloyê ya Abîezrî Yoaş
e û li bajarê Ofrayê ye de rûnişt
û Gîdeonê lawê Yoaş, bona ku ji
Midyaniyan birevîne, di mahsera
xemrê de genim dikuta. 12 Û mil-
yaketê XUDAN xwe nîşanî wî da
û jê re got: Ya egîdê dilawêr[3], XU-
DAN bi te re ye! 13 Û Gîdeon got:
Ax, efendiyê min! ger XUDAN
bi me re be, ma çima ev tiştan
hemûyan hatin serê me? Û hemû

1 Tiştekî ku nanê mirov jê tê; an jî: Nanê xwe jê dixwe.

2 Dîlitiyê.

3 Cesûr.

nuwazeyên ku bapîrên me bi go-
tina: Ma XUDAN me ji Misirê ve
dernexist? ji me re digotin, li ku
derê ne? Lê belê XUDAN niha
me avêt û me da destê Midyanê.
14 Û XUDAN lê nihêrt û got: Bi
vê quweta xwe here û Îsraêlê ji
destê Midyanê ve xelas bike! Ma
te neşandim? 15 Û jê re got: Ax,
efendiyê min! ma ez bi çi Îsraêlê
xelas bikim? A vay, malbata min
li Manaşşê, yên herî xizan in û ez
di mala bavê xwe de yê herî biçûk
im. 16 Û XUDAN jê re got: Mu-
heqeq ez ê bi te re bim û tuyê mîna
zilamekî be li Midyaniyan bixe!
17 Û jê re got: Ger niha di çavê
te de xêrê dîtibim, di derbarê yê
ku bi min re diaxife tu yî de, ela-
metekê nîşanî min bide. 18 Ez rica
dikim, heta ku ez werim û ji te re
xelata xwe derxînim û wê deynim
ber te, ji vir neqete. Û got: Heta ku
tu şunda were, ez ê bimînim.
19 Û Gîdeon ket hundir û bi ka-
rikekê û ji efayekî[1] arvan pîdeyên
bêhavên amade kirin û goşt xist
selikekê û ava goşt xist beroşekê û
wê anî bin darçiloyê û pêşkêş kir.
20 Û milyaketê Xwedê jê re got:
Goşt û pîdeyên bêhavên rahêle û
deyne ser vî zinarî û ava goşt bir-
jîne. Û wusa kir. 21 Û milyaketê
XUDAN, serê çoyê ku pê re bû
dirêj kir û da pîdeyên bêhavên û
goşt û ji zinarê ve agir derket û
goşt û pîdeyên bêhavên xwarin û
qedandin û milyaketê XUDAN ji
ber çavê wî ve winda bû. 22 Û Gî-
deon dît ku milyaketê XUDAN e
û Gîdeon got: Hey wax, ya Xudan,
XUDAN! Ji ber ku milyaketê XU-
DAN rû bi rû dîtim. 23 Û XUDAN
ji wî re got: Bila xweşî ji te re be;
metirse, tuyê nemire! 24 Û Gîdeon
li wir pêşkêşîgehekê ji XUDAN re
ava kir û navê XUDAN-Şalom[2] lê
kir; heta îrojê hîn jî li bajarê Ofrayê
ya Abîezriya ye.
25 Û wusa bû ku, wê şevê XU-
DAN jê re got: Gayê bavê xwe,
gayê wî yî duwem yê heft salî
ye rahêle û pêşkêşîgeha Baalê ya
bavê xwe xera bike û Aşera ya ku
li cem wê ye jê bike 26 û li ser
gira vê bircê, ji bo Xwedayê xwe
XUDAN pêşkêşîgehek li gor ûsilê
ava bike û gayê duwem rahêle û bi
êzingên Aşera ya ku tuyê jê bike,
pêşkêşiya şewitandinê pêşkêş
bike. 27 Û Gîdeon, ji qulên xwe
deh zilamî rahişt û mîna ku XU-
DAN jê re gotibû çêkir û wusa bû
ku, ji ber tirsa maliyên bavê xwe
û zilamên bajêr ji ber ku vî tiştî bi
rojê nikarîbû çêkira, şev çêkir.
28 Û zilamên bajêr sibehê zû
rabûn û a vay, pêşkêşîgeha
Baal xera bûbû û Aşera ya ku li
cemê ye, hatibû jêkirin û li ser

1 Li rasteka menan binêrin.

2 XUDAN Xweşî ye.

pêşkêşîgeha ku hatibû ava ki-
rin, gayê duwem hatibû pêşkêşî
kirin. 29 Û ji hev û din re gotin:
Ma kî vî karî kiriye? Û lêgeriyan
û lêkolînê kirin û gotin: Gîdeonê
lawê Yoaş vî karî kiriye. 30 Û zi-
lamên bajêr ji Yoaş re gotin: Lawê
xwe derxîne ku bila bimire, ji ber
ku pêşkêşîgeha Baal xera kir û ji
ber ku Aşera ya li cem wê bû jê
kir! 31 Û Yoaş, ji hemûyên ku li
hember wî sekinîne re got: Ma
hûn ê doza Baal bajon? An jî qey
hûn ê wî xelas bikin? Her kî ku
bona wî dozê bajo, dê sibehê bête
kuştin; ger îlah be, bila bi gotina,
yekî pêşkêşîgeha min xera kir,
dozê bajo. 32 Û bi gotina: Bila
Baal li dijî wî dozê veke, ji ber ku
pêşkêşîgeha wî xera kir; wê rojê
navê Yerrûbbaal[1] da wir.
33 Wê gavê hemû Midyanî û
Amalekiyan û lawên rojhilatê li
cem hev civiyan û derbas bûn û
di newala Yîzreêlê de artêşgehê
danîn. 34 Û Ruhê XUDAN hate
ser Gîdeon û bori hate lêxistin û
Abîezer li pêy wî civiyan. 35 Û
şandiyan ji hemûya Manaşşê re
şandin û ew jî li pêy wî civiyan
û şandiyan şandin Aşer û Zebûlûn
û Naftalî û bona pêrgîniya wan
derketin.
36 Û Gîdeon ji Xwedê re got: Ger
mîna ku te gotibû, tuyê Îsraêlê bi
destê min ve xelas bikî, 37 a vay,
ez ê jî peşma hirî deynim ser bên-
derê; ger xunav tenê li ser peşmê
be û li ser hemûya erdê ziwayî
hebe, wê gavê mîna gotina te, ez ê
bizanibim ku tuyê Îsraêlê bi des-
tê min ve xelas bike. 38 Û wusa
bû; ji ber ku dotira rojê zû rabû
û peşmê guwaşt û ji peşmê xunav
û tasekî av derxist. 39 Û Gîdeon
ji Xwedê re got: Bila hêrsa te li
dijî min sor nebe û ez, lê tenê vî
carî bibêjim; lê tenê vî carî ez ê bi
peşmê biceribînim; ji kerema xwe
niha bila ziwayî li ser peşmê be û
li ser hemûya erdê ve xunav hebe!
40 Û Xwedê wê şevê wusa kir û
ziwayî tenê li ser peşmê bû û li ser
hemûya erdê xunav hebû.

*Gîdeon Midyaniyan mexlûb dike*

7 Û Yerûb-Baal, ew Gîdeon e
û hemû neteweya ku pê re ne
zû rabûn û li ser kaniya Harodê[2]
arteşgehê danîn û artêşgeha Mid-
yanê li rojavaya wan, di newala
ku li cem girê Moreyê yî de bû.
2 Û XUDAN ji Gîdeon re got:
Bona ku ez Midyanê bidim destên
wan, hejmara netewa ku li cem
te ne zêde ye, ya na, dê Îsraêl bi
gotina: Destê min, min xelas kir!
li dijî min pesnê xwe bide. 3 Û
niha bi netewê ve bide bihîstin û
bibêje: Her kî ku ditirse û dileri-

[1] Bila Baal dozê bajo.

[2] Lerizîn.

ze bila vegere û ji çiyayê Gîleadê
şunda vegere! Û ji netewê bîst û
du hezar kes vegeriyan û deh he-
zar kes man.
4 Û XUDAN ji Gîdeon re got:
Dîsa jî hejmara netewê zêde ye;
wan daxîne avê û ez bona te li
wir wan biceribînim û dê wusa
bibe ku zilamê ku ji te re: Dê ev
zilam bi te re here gotibim, dê bi
te re here û zilamê ku: Dê bi te
re nere gotibim, dê bi te re nere.
5 Û netewê bir ber avê û XU-
DAN ji Gîdeon re got: Tuyê her
zilamê ku mîna kûçik bi zimanê
xwe vedixwe avê vedixwe cuda û
her zilamê ku bona vexwe li ser
çongên xwe rûdinî cuda deyne. 6
Û hejmara yên ku destên xwe di-
bin devên xwe û bi zimanên xwe
vedixwin bû sê sed kes; lê belê
hemûyên netewe, yên din bona
ku avê vexwin, li ser çongên xwe
rûniştin. 7 Û XUDAN ji Gîdeon
re got: Ez ê tevî sê sed kesên ku
bi zimanên xwe ve vedixwin we
xelas bikim û ez ê Midyaniyan bi-
dim destên te û bila hemû netewe,
her kes herin cîhên xwe. 8 Û wan
zewêde û boriyên netewê jî hilgir-
tin û hemûyên zilamê Îsraêlê, yên
din, her kesî şand çadirên wan; lê
belê wî sê sed mirov li cem xwe
hişt û Artêşgeha Midyanê li aliyê
wî yê jêrîn, di newalê de bû.
9 Û wusa bû ku, XUDAN wê şevê
jê re got: Rabe, dakeve artêşgehê,
ji ber ku wê dam destê te. 10 Û ger
tu ji daketinê ditirse, tevî xulamê
xwe Pûra dakeve artêşgehê 11 û
hela ka çi dibêjin, tuyê bibihîze
û paşî wê, dê destên te xwurt bi-
bin û tuyê dakeve artêşgehê. Wê
çaxê ew û xulamê wî Pûra dake-
tin cem zilamê bi çek ên ku li cem
artêşgeha wî ne. 12 Û Midyanî û
Amalekiyan 'û hemû lawên roj-
hilatê, bi pirranî, mîna kulliyan
di newalê de raketîbûn û hejmara
deveyên wan tunebû, bi pirranî
mîna qûma li qeraxa behrê. 13 Û
Gîdeon hat û a vay, zilamek xew-
nekê ji hevalê xwe re têdighand û
digot ku: A vay, xewnekê dîtim û
a vay, sominekî ji nanê ceh, ber-
bi artêşgeha Midyanê ve herikî û
hat heta çadirê û lê xist û wê avêt
û wê bi serî û binî kir û çadir ket
erdê[1]. 14 Û hevalê wî bersivê da û
got: Ev ne tiştekî din e, tenê şûrê
Gîdeonê lawê Yoaşê Îsraêlî ye;
Xwedê Midyan û hemû artêşê da
destê wî.
15 Û wusa bû ku, dema Gîdeon
çîroka xewnê û biwêja wê bihîst,
secde kir û zivirî artêşgeha Îsraêlê
û got: Rabin! ji ber ku XUDAN
artêşa Midyanê da destên we. 16 Û
sê sed mirovî kirin sê kom û bori-
yan û cerên vala û di hundirê ceran
de qendîlan da destên wan. 17 Û ji
wan re got: Li min binêrin û wusa

1 Bi erdê ve hate raxistin.

bikin û a vay, dema ez werim qera-
xa artêşgehê, dê wusa bibe ku, ger
ez çi bikim, hûn ê jî wusa bikin.
18 Dema ez û hemûyên ku bi min
re ne li boriyê bixin li hemûya
dora artêşgehê hûn ê jî li boriyan
bixin û: Bona XUDAN û bona Gî-
deon! bibêjin.
19 Û Gîdeon û sed kesên ku li
cem in, di destpêka goyîna navîn
de, dema hîn nû novedaran danîn,
ew gîhaştin qeraxa artêşgehê û li
boriyan xistin û cerên ku di destê
xwe de ne şikestandin. 20 Û her
sê kom jî li boriyan xistin û ceran
şikestandin û qendîlan di destên
xwe yî çepê de û bona ku lêxin,
boriyan di destên xwe yî rastê de
girtin û bi gotina: Şûrê XUDAN
û yê Gîdeon[1]! qêriyan. 21 Û li
dora artêşgehê her kes li cîhên
xwe sekinîn û hemûya artêşê baz
dan û qêriyan û wan bizdandin[2].
22 Û sê sed boriyî lêxistin û XU-
DAN şûrê her yekî li dijî hevalê
wî û li dijî hemûya artêşê danî û
artêş ber bi Tsererayê, heta Beyt-
Şîtta, heta sînora Abel-Mehola ku
li cem Tabbatê ye reviya. 23 Û
ji Naftalî û ji Aşerê û ji hemûya
Manaşşeyê Îsraêliyan civiyan û
bera pêy Midyanê dan.
24 Û Gîdeon şandiyan ji hemûya
çiyayiya Efrayîm re şand û got:
Li hember Midyanê dakevin û ji
pêşiya wan ve heta Beyt-Barayê
avan û Urdunê bigirin[3]! Û hemû
Efrayîmî civiyan û heta Beyt-
Barayê avan û Urdunê bi dest ve
xistin. 25 Û her du serokên Mid-
yaniyan, Oreb û Zeeb bi dest ve
xistin û Oreb, li zinarê Oreb kuştin
û Zeeb jî li mahsera xemrê ya
Zeeb kuştin û bera pêy Midyanê
dan û seriyên Oreb û Zeeb ji Ur-
dunê wêdetirê ji Gîdeon re anîn.

*Zebah û Tsalmûnna*

8 Û Efrayîmî jê re gotin: Ma gava
tu çû li dijî Midyanê cengê, bi
bang nekirina me ya ku tu bi me
dikî çi ye? Û bi dijwarî pê re ke-
tin keftûleftê. 2 Û ji wan re got:
Ma li cem kirina we, ya ku niha ez
dikim çi ye? Tiriyên ku ji ber rez
xerakirina Efrayîm ve dimînin,
ji zadê rez xerakirina Abîezer ne
qenctir in? 3 Xwedê serokên Mid-
yanê, Oreb û Zeeb dan destê we û
ma li cem kirina we, min karîbû çi
bikira? Dema vê yekê got, hêrsa
wanî li dijî wî aş bû.
4 Û Gîdeon gîhaşt Urdunê, ew û
sê sed merivên westiyane, lê belê
bera pêy didin wir derbas kirin.
5 Û wî ji zilamên Sûkkot re got:
Ez rica dikim somiyên nanan bi-
din netewa ku li pêy min in; ji ber

[1] An jî: Şûrek ji bo XUDAN û Gîdeon.
[2] Dan revandin.
[3] Bi dest ve bixin.

ku westiyane û ez bera qiralên
Midyanê, Zebah û Tsalmûnna di-
dim. 6 Û serokên Sûkkotê gotin:
Ma zenda Zebah û Tsalmûnna
qey niha di destê te de ye ku em
nan bidin artêşa te? 7 Û Gîdeon
got: Bo vê yekê dema XUDAN
Zebah û Tsalmûnna bide destê
min, ez ê bi kelemên çolê û bi
qirş û qalan li goştên we bixim!
8 Û ji wir hilkişiya Penûêlê û ji
wan re jî bi vî awayî got; zilamên
Sûkkotê çawa bersiv dabûnê, zi-
lamên Penûêlê jî wusa gotin. 9 Û
bi zilamên Penûêlê ve jî axifî û ji
wan re got: Gava ez bi xweşî û
silametî vegerim, ez ê vê qûleyê
xera bikim!
10 Û Zebah û Tsalmûnna û qasî
panzdeh hezar kesî artêşa wan,
hemûyên ku ji artêşa lawên roj-
hilatê mane, li Karkorê bûn û sed
û bîst hezar zilamên ku şûr bikar
tînin ketibûn. 11 Û Gîdeon ji roj-
hilata Nobah û Yogbeha, ji rêya
ku yên di çadiran de rûdinin derket
û li artêşê xist; ji ber ku artêş bê-
xem bû. 12 Û Zebah û Tsalmûnna
reviyan û bera pêy wan dan û bi
her du qiralên Midyanê, bi Zebah
û Tsalmûnna ve girt û hemûya
artêşê xera kir.
13 Û Gîdeonê lawê Yoaş ji kaşa
Heresê ji cengê vegeriya. 14 Û
xortekî ji zilamên Sûkkotê yî girt
û jê pirsî û ew serokên Sûkkotê û
kalepîrên wê, heftê û heft kesî ni-
vîsand û ji wî re got. 15 Û ew hat
û ji zilamên Sûkkotê re got: Zebah
û Tsalmûnnayê ku we bi gotina:
Ma zenda Zebah û Tsalmûnna qey
niha di destê te de ye ku em nan
bidin artêşa te? bona wan qerfên
xwe bi min re kirin, a vay Zebah û
Tsalmûnna! 16 Û kalepîrên bajêr û
kelemên çolê û qirş û qalan rahiştin
û bi wan re hînkariyê da zilamên
Sûkkotê. 17 Û qûleya Penûêlê xera
kir û zilamên bajêr kuştin.
18 Û ji Zebah û Tsalmûnna re got:
Zilamên ku we li Taborê kuştibûn
çawa bûn? Û gotin: Tu çawa be,
ew jî wusa bûn; her yek mîna
lawên qiralan bûn. 19 Û got: Bi-
rayên min, lawên dayika min bûn;
bona mafê XUDANê ku zindî ye,
ger we wan bi saxitî bihiştana,
min we nedikuşt! 20 Û ji lawê
xwe yî yekem Yeter re got: Rabe
û vana bukuje! Lê belê xort şûrê
xwe nekişand; ji ber ku ditirsiya ji
ber ku hîn ciwan bû. 21 Û Zebah û
Tsalmûnna ji Gîdeon re gotin: Tu
rabe û me bukuje; ji ber ku zilam
çawa be, hêza wî wusa ye! Û Gî-
deon rabû û Zebah û Tsalmûnna
kuşt û heyvokên ku di histuyê de-
veyên wan de daliqandîne rahişt.
22 Û zilamên Îsraêlê ji Gîdeon re
gotin: Bila tu, lawê te û lawê lawê
te serweriyê ji me re bikin; ji ber
ku te me ji destê Midyanê ve xelas
kir! 23 Û Gîdeon ji wan re got: Ez
serweriyê ji we re nakim û dê lawê

min jî serweriyê ji we re neke; dê
XUDAN serweriyê ji we re bike!
24 Û Gîdeon ji wan re got: Xwes-
tekek min ji we heye, bila her
kes xelekên ku ji talanê rahiştine,
bidin min! Ji ber, bona ku ew Îs-
maîlî bûn, xelekên wanî zêr hebûn.
25 Û gotin: Em ê bi dilxweşiyê bi-
din û kincek li erdê raxistin û her
kes xelekên ku ji talanê rahiştibûn
avêtin wir. 26 Û xeynî heyvok,
guhar û kincên erxewanî yên ku
li ser qiralên Midyanê bûn û xey-
nî zincîrên ku di histuyên deveyan
de bûn, giraniya xelekên zêrîn ên
ku wî dixwestin hezar û heft sed
şekel[1] zêr bûn. 27 Û Gîdeon ji wê
efodekê çêkir û wê danî bajarê
xwe, Ofrayê û hemûya Îsraêl li wir,
li pêy wê zinê kirin û ji Gîdeon re
û ji maliyên wî re bû dafikek. 28 Û
Midyan li ber lawên Îsraêl nizm bû
û carekî din jî serê xwe ranekirin.
Û welat di rojên Gîdeon de çel sal
aramiyê dît.

*Mirina Gîdeon*

29 Û Yerûb-Baalê lawê Yoaş çû
û li mala xwe rûnişt. 30 Û heftê
lawên Gîdeon ên ku ji nîjada wî
dihatin hebûn; ji ber ku jinên wî
pirr bûn. 31 Û cariya wî ya ku li
Şekemê rûdinişt jî lawekî jê re anî
dinê û navê Abîmelek lê kir. 32 Û
Gîdeonê lawê Yoaş di kalepîriya
xweşik de mir û di bajarê Ofrayê
ya Abîezriyan de, di gora bavê
xwe Yoaş de hate binax kirin.
33 Û wusa bû ku dema Gîdeon
mir, lawên Îsraêl zivirîn û li pêy
Baalan zinê kirin û Baal-Berît ji
xwe re kirin îlah. 34 Û lawên Îs-
raêl, XUDAN Xwedayê xwe ê ku
wan ji destê hemû neyarên ku li
dora wan in, azad kirine di bîra
xwe de neanîn 35 û li gor hemû
qenciya ku ji mala Yerûb-Baal-
Gîdeon, ji Îsraêlê re kirine, xêrê
nekirin.

*Abîmelek*

9 Û Abîmelekê lawê Yerûb-Baal
çû Şekemê, cem dayik û bi-
rayên xwe û bi wan re û ji hemû
eşîra dayik û bavê xwe re axifî û
got: 2 Ez rica dikim, ji hemû mêrên
Şekemê re bidin bihîstin û bibêjin:
Bona we kîjan qenctir e; bila heftê
kesî hemû lawên Yerûb-Baal, an jî
tenê kesek serweriyê ji we re bike?
Û di bîra xwe de bînin ku ez hestî
û goştê we me. 3 Û birayên dayika
wî hemû van gotinan bi giştikên
mêrên Şekemê ve dan bihîstin û
gotin û dilên wan, berbi li pêy Abî-
melek çûnê ve çû; ji ber ku: Ew bi-
rayê me ye, gotin. 4 Û ji mala Baal-
Berît ve heftê parî zîvî dan wî û
Abîmelek bi vana zilamên lîstok û
dilbijok girt û li pêy wî çûn. 5 Û hat
Ofrayê, mala bavê xwe û birayên
xwe, heftê lawên Yerûb-Baal li ser

[1] Li rasteka menan binêrin.

kevirekî kuşt; tenê Yotamê lawê Yerûb-Baalê biçûk sax ma; ji ber ku xwe veşart. 6 Û hemû zilamên Şekemê û hemûya Beyt-Mîllo civiyan û çûn û li ber çiloya kevirê çikandî ya Şekemê danezaniya qiraletiya wî kirin.

7 Û ji Yotam re gîhandin û çû û li ser girê çiyayê Gerîzîmê sekinî û bi dengekî bilind qêriya û ji wan re got: Min guhdarî bikin, ya zilamên Şekemê, dê Xwedê jî we guhdarî bike. 8 Di demekê de daran, bona ku qiral ji xwe re mesh bikin çûn û ji darê zeytûnê re gotin: Ji me re bibe qiral. 9 Û darê zeytûnê ji wan re got: Ez rûnê ku Xwedê û mirov di min de pesnahî dane berdim û herim li ser daran kil bibim? 10 Û daran ji darê hêjîrê re gotin: Tu were û ji me re bibe qiral! 11 Û darê hêjîrê ji wan re got: Ma ez şêrîniya xwe û mêwa xwe ya qenc berdim û herim li ser daran kil bibim? 12 Û daran ji dêlîtê re gotin: Tu were û ji me re bibe qiral! 13 Û dêlîtê ji wan re got: Ma qey ez xemra xwe ya nû ya ku Xwedê û mirovan kêfxweş dike berdim û herim li ser daran kil bibim? 14 Û hemûya daran çûn û ji kelema reş re gotin: Tu were û ji me re qiraletiyê bike! 15 Û kelema reş ji daran re got: Ger bi rastî jî hûn ê min ji xwe re bi qiraletî mesh bikin, de werin têkevin bin siya min[1]; ya na bila ji kelema reş ve agir derkeve û bila darên erzê ên Lubnanê bixwe û biqedîne. 16 Û niha, ger we bi danezaniya qiral kirina Abîmelek li gor maf û rastiyê kiribin û ger li dijî Yerûb-Baal û mala wî bi qenciyê kiribin û xelata destên wî dabin wî 17 – ji ber ku bavê min bona we cengê kir û canê xwe pêş ve avêt û we ji destê Midyanê ve azad kir 18 û îro hûn li dijî mala bavê min rabûn û we lawên wî, heftê kesî li ser kevirekî kuştin û Abîmelekê lawê cariya wî ji mêrên Şekemê re kirin qiral, ji ber ku ew birayê we ye –; 19 ger îroj we li dijî Yerûb-Baal û mala wî li gor rastiyê û bi qenciyê kiribin, bi Abîmelek re kêfxweş bibin, bila ew jî bi we re kêfxweş bibe; 20 ger ew tune be, bila ji Abîmelek ve agir derkeve û mêrên Şekemê û Beyt-Mîlloyê bixwe û biqedîne û bila ji mêrên Şekemê û ji Beyt-Mîlloyê agir derkeve û Abîmelek bixwe û biqedîne! 21 Û Yotam baz da û reviya û çû Beerê û ji ber ku ji birayê xwe Abîmelek ve ditirsiya, li wir rûnişt.

22 Û Abîmelek sê sal ji Îsraêlê re bû serok. 23 Û Xwedê ruhekî xerab şand nav Abîmelek û mêrên Şekemê û mêrên Şekemê li dijî Abîmelek bi fenekiyê kirin; 24 da ku, bila zordariya ku li heftê lawên

1 Di bin siya min de xwe bisitirînin.

Yerûb-Baal kirine were ser wî û
xwîna wan, bila bi ser birayên wan
Abîmelekê ku wan kuştine û bi ser
mêrên Şekemê ên ku bona birayên
xwe bikujin destên wî xwurt kirine
bête danîn. 25 Û mêrên Şekemê li
seriyên çiyayan jê re kemînê danîn
û di rê de, hemûyên ku ji cem wan
derbas dibûn, tazî dikirin; ev jî ji
Abîmelek re hate gîhandin.
26 Û Gaalê lawê Ebed û birayên
wî hatin û derbasî Şekemê bûn û
mêrên Şekemê, bi wî ewle bûn.
27 Û derketin beyarê û tiriyên
wan dan hev, pelixandin û şahiyan
çêkirin û ketin malên îlahên xwe
û xwarin û vexwarin û naletê ji
Abîmelek kirin. 28 Û Gaalê lawê
Ebed got: Ma Abîmelek kî ye û
Şekem kî ye ku em qûlitiyê jê re
bikin? Û ma karmendê wî jî ne
Zebûl e? Ji zilamên Hamorê bavê
Şekem re qûlitiyê bikin! Lê belê
ma çima em ê qûlitiyê jê re bikin?
29 Û xwezîka netewe di destê min
de ba! Wê gavê min ê Abîmelek
bavêta! Û ji Abîmelek re got:
Artêşa xwe zêde bike û derkeve!
30 Û dema Zebûlê serokê bajêr,
gotinên Gaalê lawê Ebed bihîst
hêrsa wî sor bû. 31 Û bi dizîka
şandiyan ji Abîmelek re şand û
got: A vay, Gaalê lawê Ebed û
birayên wî hatin Şekemê û a vay,
zorê didin bajêr bona ku li dijî te
bisekine. 32 Û niha tu û netewa
tevî te şevê rabin û li beyarê, bike-
vin kemînê[1] 33 û dê wusa bibe ku,
dema sibehê roj derketderneket
tuyê zû rabe û êrîşê bajêr bike û a
vay, dema ew û netewa ku tevî wî
ne li dijî te rabin, tuyê tiştê ku ji
destê te ve tê li dijî wî bike.
34 Û Abîmelek û tevî wî hemûya
netewê şevê rabûn û bi çar
komîbûnê li dijî Şekemê kemînê
avêtin. 35 Û Gaalê lawê Ebed
derket û li cîhê ketina deriyê ba-
jêr sekinî û Abîmelek û netewa ku
tevî wî bûn ji kemînê rabûn. 36 Û
Gaal netewê dît û ji Zebûl re got:
A vay, ji girên çiya neteweyek
dadikeve. Û Zebûl jê re got: Tiştê
ku tu mîna zilaman dibînî, siya
çiyaya ne. 37 Û Gaal dîsa axifî
û got: A vay, ji nava welat nete-
weyek dadikeve, ji rêya çiloya
Menoem jî birrek tê. 38 Wê gavê
Zebûl jê re got: Ka ew devê te yê
digot: Ma Abîmelek kî ye ku em
qûlitiyê jê re bikin niha li ku ye?
Ma netewa ku te biçûk didît, ne
ev e? De niha derkeve û bi wan
re cengê bike! 39 Û Gaal derket
ber mêrên Şekemê û bi Abîmelek
re cengê kir. 40 Û Abîmelek bera
pêy wî da û Gaal ji ber wî reviya û
heta cîhê ketina derî, pirr zilamên
ku hatine lêxistin ketin.
41 Û Abîmelek li Arûmayê rûnişt
û Zebûl nehişt ku Gaal û birayên
wî li Şekemê rûnin û wan qewi-

[1] Kemînê deynin.

rand. 42 Û wusa bû ku, roja din
netewe derketin beyarê û ji Abî-
melek re gîhandin. 43 Û netewê
rahişt û wan bi sê birrî cuda kir û
li beyarê ketin kemînê û nihêrt û
a vay, netewe ji bajêr ve derdike-
tin û li dijî wan rabû û li wan xist.
44 Û Abîmelek û birrên ku li cem
wî bûn, pêş ve êrîş kirin û li cîhê
ketina deriyê bajêr sekinîn û du
birr, êrîşî ser hemûyên ku li be-
yarê ne kirin û li wan xistin. 45 Û
Abîmelek, hemûya wê rojê li dijî
bajêr cengê kir û bajar bi dest ve
xist û netewa ku di wê de ne kuşt
û bajêr xera kir û xwê pê çand[1].
46 Û gava hemûyên mêrên
Şekemê vêya bihîstin, ketin birca
mala El-Berîtê. 47 Û civandina
hemûyên mêrên qûleya Şekemê ji
Abîmelek re hate gîhandin. 48 Û
Abîmelek û hemû neteweya ku pê
re ne, derketin çiyayê Tsalmonê
û Abîmelek bivirekî rahişt destê
xwe û guliyekî ji daran ve jê kir
û wê rakir û danî ser milên xwe û
ji netewa ku li cem in re got: We
kirina min dîtin, de bilezin hûn jî
mîna min bikin. 49 Û hemûya ne-
tewê jî, her yek guliyekî jê kirin
û li pêy Abîmelek çûn û sipartin
bircê û li ser wan agir bi bircê ve
xistin û teviya zilamên qûleya
Şekemê jî, qasî hezar kesî mêr û
jin mirin.
50 Û Abîmelek çû Tebetsê û li
hember Tebetsê artêşgehê danî û
wê bi dest ve xist. 51 Û di nava
bajêr de qûleyek zexm hebû û
hemû mêr û jin û hemû mêrên
bajêr reviyan wir û li pêy xwe gir-
tin û derketin ser xaniya qûleyê.
52 Û Abîmelek hate heta qûlê û li
dijî wê cengê kir û bona ku agir
pêxe, heta deriyê qûleyê nêzîk
bû. 53 Û pîrekek kevirê destarê,
ê ser avêt serê Abîmelek û serê wî
şikand. 54 Û bi lezî bangî xulamê
xwe, yê ku çekê wî hilgirtine kir
û jê re got: Şûrê xwe bikişîne û
min bukuje, da ku, bila bona min:
Pîrekekê wî kuşt nebêjin! Û xu-
lamê wî, şûrê xwe tê de rakir û ew
mir. 55 Û dema Îsraêliyan mirina
Abîmelek dîtin her kes çû cîhê
xwe. 56 Xwedê, xerabiya ku Abî-
melek bi kuştina heftê birayê xwe
ji bavê xwe re kiribû, bi vî awayî
lê wergerand 57 û Xwedê hemû
xerabiya mêrên Şekemê, li serê
wan wergerand û naleta Yotamê
lawê Yerûb-Baal hate ser wan.

*Tola*

10 Û paşî Abîmelek, bona Îs-
raêlê xelas bike, ji Îssakarê
zilamek, Tolayê lawê Pûayê, lawê
Dodo rabû û ew bi xwe li çiyayiya
Efrayîmê, di Şamîrê de rûdinişt.
2 Û bîst û sê sal serweriyê ji Îs-
raêlê re kir û mir û li Şamîrê hate
binax kirin.

1 Xwê lê weşand.

*Yaîr*

3 Û li pêy wî Yaîrê Gîleadî rabû
û bîst û du sal serweriyê li Îsraêlê
kir. 4 Û sîh lawê wî yên ku li sîh
dahşikî siwar dibin hebûn û sîh
bajarên wan hebûn û ji van ba-
jarên ku li Gîleadê ne re heta îroj
Havvot-Yaîr[1] tê gotin. 5 Û Yaîr
mir û li Kamonê hate binax kirin.

*Yeftah*

6 Û dîsa lawên Îsraêl, tiştê ku di
çavê XUDAN de xerab e kirin û
ji Baalan re û ji Astartiyan re û ji
îlahên Aramê re û ji îlahên Say-
dayê re û ji îlahên Moabê re û ji
îlahên lawên Ammon re û ji îlahên
Filistiyan re qûlitiyê kirin û XU-
DAN berdan û jê re qûlitiyê neki-
rin. 7 Û li dijî Îsraêlê, hêrsa XU-
DAN sor bû û wan ji Filistiyan re û
ji lawên Ammon re firotin. 8 Û di
wê salê de tahdê li lawên Îsraêl re
kirin û tengasiyê dan wan û hîjdeh
salî hemû lawên Îsraêl, ên ku ji Ur-
dunê wêdetir, li welatê Amoriyên
li Gîleadê ne eciqandin[2]. 9 Û lawên
Ammon, bona ku li dijî Cihûda û
Benyamîn û mala Efrayîm jî cengê
bikin, ji Urdunê ve derbas bûn û
Îsraêl zehf aciz bû[3].
10 Û lawên Îsraêl ji XUDAN re
qêriyan û gotin: Me li dijî te sûc
kirin, ji ber ku me Xwedayê xwe
berdan û ji Baalan re qûlitiyê ki-
rin. 11 Û XUDAN ji lawên Îsraêl
re got: Ma min we ji Misiriyan û ji
Amoriyan, ji lawên Ammon û ji Fi-
listiyan xelas nekirin? 12 Saydayî
û Amalekî û Maoniyan jî zorê dan
we û we qêrîn û hawarê ji min re
kirin û we ji destê wan xelas kirim.
13 Lê we jî min berdan û ji îlahên
din re qûlitiyê kirin; bo vê yekê ez
carekî din we xelas nakim. 14 He-
rin û ji îlahên ku we bijartîbûn re
biqêrin; bila di dema tengasiya we
de ew we xelas bikin! 15 Û lawên
Îsraêl ji XUDAN re gotin: Me sûc
kirin; yê ku di çavê te de qenc tête
xuyanî kirin her çi be, li gor wê
ji me re bike; lê belê tenê îroj me
azad bike! 16 Û îlahên biyan ji nav
xwe derxistin û ji XUDAN re qûli-
tiyê kirin û ji ber tengasiya Îsraêl,
canê XUDAN aciz[4] bû.
17 Û lawên Ammon civiyan û li
Gîleadê artêşgehê danîn. Lawê
Îsraêlê jî civiyan û li Mîtspa-
yê artêşgehê danîn. 18 Û nete-
we, serokên Gîleadê ji hev û din
re gotin: Ev zilamê ku dê li dijî
lawên Ammon dest bi cengê bike,
gelo kî ye? Dê ew ji hemû gelên
Gîleadê re bibe serok.

11 Û Yeftahê Gîleadê mêr-
xasekî dilawêr bû û lawê

[1] Navçeyên Yaîrê.
[2] Pelixandin, tahdê li wan kirin.
[3] Ket tengasiyê.
[4] Bêhnteng bû.

fahîşekekê bû û bavê wî Gîlead
bû. 2 Û pîreka Gîlead jî jê re zaro-
kan anî dinê û gava lawên pîrekê
mezin bûn, Yeftah qewirandin û
jê re gotin: Tuyê ji mala bavê me
mêrasê ranehêle; ji ber ku tu lawê
pîrekek din î! 3 Û Yeftah ji birayên
xwe ve reviya û li welatê Tobê
rûnişt û zilamên bêkêr li cem Yef-
tah civiyan û tevî wî êrîşan dikirin.
4 Û wusa bû ku paşî demekê,
lawên Ammon li dijî Îsraêlê rabûn
cengê. 5 Û wusa bû ku, gava lawên
Ammon li dijî Îsraêlê rabûn cengê
kalepîrên Gîleadê, bona ku Yeftah
ji welatê Tobê bînin çûn 6 û ji Yef-
tah re gotin: Were û ji me re bibe
serok û em li dijî lawên Ammon
ve cengê bikin! 7 Û Yeftah ji ka-
lepîrên Gîleadê re got: Ma hûn ji
min nekerihîn û we min ji mala
bavê min neqewirandin? Û niha,
di dema tengasiya xwe de çima
hûn hatin cem min? 8 Û kalepîrên
Gîleadê ji Yeftah re gotin: Em niha
bona vê vegeriyan cem te, da ku,
tu jî bi me re vegere û li dijî lawên
Ammon, tevî me cengê bike û tuyê
ji me re, ji hemûya gelê Gîleadê re
bibe serok. 9 Û Yeftah ji kalepîrên
Gîleadê re got: Ger hûn, bona li
dijî lawên Ammonê ceng kirinê
min şûn de bibin û XUDAN li ber
min wan bide dest, ma ez ê ji we
re bibim serok? 10 Û kalepîrên
Gîleadê ji Yeftah re gotin: Bila
di nava me de XUDAN ji gotina
me re bibe şahde; muheqeq em ê
li gor gotina te bikin! 11 Û Yeftah,
tevî kalepîrên Gîleadê çû û netewe
wî ji xwe re kirin fermandar û se-
rok û Yeftah hemû gotinên xwe li
Mîtspayê, li ber XUDAN gotin.
12 Û Yeftah, şandiyan ji qiralê
lawê Ammon re şand û got: Di
navbera me de çi heye ku tu, bona
ku li dijî welatê min cengê bikî bi
ser min ve hat? 13 Û qiralê lawên
Ammon, ji şandiyên Yeftah re got:
Ji ber ku dema Îsraêl ji Misirê ve
derket, ji Arnonê heta Yabbokê û
heta Urdunê dest da ser welatê min
û niha bi aşitiyê wê şunda bide.
14 Û Yeftah, dîsa şandiyan ji
qiralê lawên Ammon re şand
15 û jê re got: Yeftah wusa dibêje:
Îsraêl welatê Moabê, an jî welatê
lawên Ammon nestendin; 16 lê
dema ji Misirê derketin, Îsraêl heta
Behra Gewez di çolê de meşiya û
hate Kadeşê 17 û Îsraêl şandiyan
ji qiralê Edomê re şand û got: Ez
rica dikim, ez ji nava welatê te ve
derbas bibim! lê belê qiralê Edomê
guhdarî nekir. Û ji qiralê Moabê
re jî şand, lê belê wî jî nexwest û
Îsraêl li Kadeşê ma. 18 Û di çolê
de meşiya û li dora welatê Edomê
û welatê Moabê ve zivirî û gîhaşt
rojhilata welatê Moabê û ji şetê
Arnonê wêdetir bicîh bûn[1], lê belê
neketin hundirê sînorê Moabê, ji

1 Kon, an jî: Qonax danîn.

ber ku sînorê Moabê Arnon bû.
19 Û Îsraêl ji qiralê Amoriyan
re ji Sîhonê qiralê Heşbonê re
şandiyan şand û Îsraêl jê re got:
Em rica dikin, ji hundirê welatê
te ve em derbasî cîhê xwe bibin!
20 Û Sîhon ewle nebû ku dê Îsraêl
ji sînorê wî ve derbas bibe û here
û Sîhon hemûya netewa xwe da
hev û li Yahatsê artêşgehê danîn
û bi Îsraêlê re cengê kirin. 21 Û
Xwedayê Îsraêlê XUDAN, Sîhon
û hemû netewa wî dan destê Îsraêl.
û li wan xistin û Îsraêl warê hemû
Amoriyên ku li wir rûdinin bi
milkî girt. 22 Û ji Arnonê heta
Yabbokê û ji çolê heta Urdunê
hemû sînorên Amoriyan bi milkî
girtin. 23 Û niha Xwedayê Îsraêlê
XUDAN, Amoriyan ji ber netewa
xwe Îsraêl ve qewirand û qey tuyê
wana ji xwe re bike milk? 24 Ma
tu nikarî milkê ku îlahê te Kemoş
daye te ji xwe re bike milk? Yên
ku Xwedayê me XUDAN ji ber
me ve qewirandine, em ê jî wan ji
xwe re bikin milk. 25 Û ma niha
qet aliyek te yî ji qiralê Moabê,
Balakê lawê Tsîppor ve qenctir
heye? Ma ew tu carî bi Îsraêlê re
ketiye keftûleftê, an jî li dijî wan
tu carî cengê kiriye? 26 Ma sê sed
sal e Îsraêl li Heşbon û navçeyên
wê û li Aroer û navçeyên wê û li
hemû bajarên ku li warê Arnonê
bûn, çima di navbera vê demê de
we wan xelas nekirin? 27 Û min
li dijî te sûc nekir, lê belê tu, bi li
dijî min cengê kirinê ve xerabiyê
bi min re dike; XUDANê ku
Serwer e, bila îroj di nava lawên
Îsraêl û di nava lawên Ammon de
daraziyê bike! 28 Lê belê qiralê
lawên Ammon, gotinên ku Yeftah
jê re şandibûn guhdarî nekirin.
29 Û Ruhê XUDAN hat ser Yef-
tah û ew ji Gîleadê û ji Manaşşeyê
ve derbas bû û ji Mîtspeyê ya ku
li Gîleadê derbasî cem lawên Am-
mon bû. 30 Û Yeftah pêşkêşiyê ji
XUDAN re pêşkêşî kir û got: Ger
tuyê muheqeq lawên Ammon bidî
destên min, 31 dê wê gavê wusa
bibe ku, dema ez bi selametiyê ji
lawên Ammon ve vegerim, yê ku
bona pêrgîniya min bikin, ji deri-
yên mala min ve derkeve, dê bibe
yê XUDAN û ez ê wê bi pêşkêşiya
şewitandinê ve pêşkêş bikim!
32 Û Yeftah, bona ku bi lawên Am-
mon re cengê bike, çû û XUDAN
wan dan destê wî. 33 Û ji Aroerê
heta bigihêje Mînnîtê bîst bajarî û
heta Abel-Keramîmê bi lêxistinek
mezin li wan xistin. Û lawên Am-
mon li ber lawên Îsraêl nizm bûn.
34 Û Yeftah hate Mîtspayê, mala
xwe û a vay, qîza wî bi tef û req-
san hate pêrgîniya wî û zaroka wî
ya tekane bû; ne law, ne jî qîz,
xeynî wê nîn bû. 35 Û wusa bû
ku, gava wê dît, kincê xwe çirand
û got: Hey wax qîza min, te pişta
min xwar kir û tu jî bû yek ji yên

ku min dieciqînin; min ji XUDAN
re got, êdî ez nikarim vegerim!
36 Û jê re got: Bavo, te ji XUDAN
re got; madem ku XUDAN ji ne-
yarên te, ji lawên Ammon ve bo te
tolê hilda, çawa ji devê te derketi-
be, wusa bike. 37 Û ji bavê xwe re
got: Bila ji min re wusa bête kirin;
min du mehî berde û ez herim û
dakevim çiyayên jêrîn û tevî he-
valên xwe ji qîzitiya xwe re bi-
girîm. 38 Û: Here got. Û wê bona
du mehî şand û tevî hevalên xwe
çû û li ser çiyayan, bona qîzitiya
xwe giriya. 39 Û wusa bû ku paşî
du mehî, vegeriya cem bavê xwe
û li gor qewla ku dabû, lê wusa
kir; lê belê wê bi mêr nizanîbû. Û
li Îsraêlê bû kevneşop 40 û ji salê
heta salê keçikên Îsraêlê, bona
qîza Yeftahê Gîleadî di salê de çar
roj bona şînê bigirin diçûn.

*Yeftah û Efrayîm*

12 Û zilamên Efrayîmê civi-
yan û derbasî berbi bakurê
çûn û ji Yeftah re gotin: Ma çima
tu bona ku bi lawên Ammon re
cengê bikî, derbas bû û bona ku
bi te re herin te bangî me nekir?
Em ê mala te li ser te vêxin! 2 Û
Yeftah ji wan re got: Şerek me yî
mezin ya min û ya netewa min bi
lawên Ammon re hebû û bangî
we kirim û we min ji destê wan
ve xelas nekirin. 3 Û gava dîtim
ku hûn min ji destên wan ve xelas
nakin, canê xwe girtim destê xwe
û derbasî hemberî lawên Ammon
bûm û XUDAN wan dan destê
min û ma îroj çima hûn bona ku
li dijî min cengê bikin derke-
tin? 4 Û Yeftah hemû zilamên
Gîleadî civandin û bi Efrayîm re
cengê kirin û zilamên Gîleadî li
Efrayîm xistin, ji ber ku gotin: Ya
yên Gîleadî, di navbera Efrayîm
û di navbera Manaşşe de hûn re-
vokên Efrayîm in! 5 Û Gîleadî li
hember Efrayîmiyan, buhurkên
Urdunê girtin. Û wusa bû ku yek
ji revokên Efrayîmiyan, dema di-
got: Ez ê derbas bibim, zilamên
Gîleadî: Ma tu Efrayîmî yî? digo-
tin. Û ger bigota: Na! 6 Wê gavê
jê re: De hela bibêje Şîbbolet! di-
gotin. Û zilam: Sîbbolet digot; ji
ber ku nikarîbû wê rast bigota û bi
wî digirtin û di buhurkên Urdunê
de serjê dikirin û di wê demê de ji
Efrayîmê çel û du hezar kes ketin.
7 Û Yeftah, şeş sal li ser Îsraêlê
serweriyê ajot. Û Yeftahê Gîleadî
mir û di bajarekî ji bajarên Gîleadê
de hate binax kirin.

*Îbtsan, Elon û Abdon*

8 Û paşî wî, ji Beytlehemê Îbtsan
serweriyê li Îsraêlê kir. 9 Û sîh
lawên wî hebûn û sîh qîzî şandin
derve û ji derve sîh qîzî bona lawên
xwe anîn. Û heft salî li ser Îsraêlê
serweriyê ajot. 10 Û Îbtsan mir û
li Beytlehemê hate binax kirin.

11 Û paşî wî, Elonê Zebûlûnî ser-
weriyê li ser Îsraêlê kir û deh salî
li ser Îsraêlê serweriyê ajot. 12 Û
Elonê Zebûlûnî mir û li welatê
Zebûlûnê, li Ayyalonê hate binax
kirin.
13 Û paşî wî, Abdonê lawê Hîllelê
Pîratonî serweriyê li Îsraêlê kir.
14 Û çel law û sîh neviyên wî yên
ku li ser heftê dahşikî siwar dibûn
hebûn û heyşt salî serweriyê li
ser Îsraêlê ajot. 15 Abdonê lawê
Hîllelê Pîratonî mir û li çiyayiya
Amalekiyan, li welatê Efrayîmê,
li Pîratonê hate binax kirin.

*Bûyîna Şîmşon*

Lûq 1,5-16;4.Mûs 6,1-8

13 Û dîsa lawên Îsraêl; yê ku
di çavên XUDAN de xe-
rab e kirin û XUDAN wan çel salî
da destê Filistiyan.
2 Û ji nîjada Daniyan zilamekî So-
ayî hebû û navê wî Manoah bû û
ina wî stewr bû û zarokan nedianî
inê. 3 Û milyaketê XUDAN bi
îrekê ve xuyanî bû û jê re got: A
y, niha tu stewr î û zarokan nay-
dinê; lê belê tuyê ducanî bibî û
wekî bînî dinê[1]. 4 Û niha ez rica
kim, tu carî xemr û araqê vene-
e û qet tiştekî mindar nexwe!
i ber ku a vay, tuyê ducanî bimînî
aweki bînî dinê û divê gûzan li
ê wî nekeve; ji ber ku dê ji reh-
ma dayikê ji Xwedê re bibe Nezîr[2]
û dê ew destpêbike û Îsraêl ji destê
Filistiyan ve xelas bike. 6 Û pîrek
hat û bi zilamê xwe re axifî û got:
Zilamekî Xwedê hate cem min û
xuyanîbûna wî, mîna xuyanîbûna
milyaketê Xwedê zehf bisawir bû
û ka ji ku derê ye jê nepirsiyam û
navê xwe jî ji min re negot; 7 lê
belê ji min re got: A vay, tuyê du-
canî bimîne û niha xemr û araqê
venexwe û qet tiştekî mindar ne-
xwe; ji ber ku lawik dê ji rehma
dayikê heta roja ku bimire ji Xwe-
dê re bibe Nezîr!
8 Û Manoah li ber XUDAN ge-
riya û got: Ya XUDAN, ez lava
dikim, bila zilamê Xwedê, ê ku te
şandibû dîsa were û ka em ê bona
lawikê ku bibe çi bikin, hînî me
bike. 9 Û Xwedê dengê Manoah
bihîst û dema pîrek di zeviyê de
rûniştîbû, milyaketê Xwedê dîsa
hat cem wê; lê belê zilamê wê
Manoah ne pê re bû. 10 Û pîrekê
lez kir, baz da û ji zilamê xwe re
gîhand û got: A vay, ew zilamê ku
roja par hatibû cem min, dîsa ji
min re xuyanî bû. 11 Û Manoah
rabû û li pêy pîreka xwe çû û hate
cem zilam û got: Ma zilamê ku ji
pîrekê re gotiye, tu yî? Û wî: Ez
im, got. 12 Û Manoah got: Niha,
gava gotinên te werin cîh, dê dara-
ziya di derheqê zarok û karê wî de

çi bibe? 13 Û milyaketê XUDAN
ji Manoah re got: Bila pîrek, ji her
tiştên ku jê re gotime xwe biparê-
ze. 14 Bila ji tu tiştê ku ji mêwa
rez ve derdikeve nexwe û xemr û
araqê venexwe û tu tiştê mindar
nexwe û bila bi her tiştê ku jê re
emir kirime, bigire.
15 Û Manoah ji milyaketê XU-
DAN re got: Ez rica dikim, em
te biezimînin[1] û bona te karikekê
amade bikin. 16 Û milyaketê XU-
DAN ji Manoah re got: Tu min
biezimînî[2] jî ez ji nanê te naxwim
û ger tuyê pêşkêşiya şewitandinê
pêşkêş bikî; divê tu wê ji XU-
DAN re pêşkêş bikî. Ji ber, Ma-
noah nizanibû ku ew milyaketê
XUDAN e. 17 Û Manoah ji mil-
yaketê XUDAN re got: Ma navê
te çi ye, da ku, dema gotinên te
bên cîh, em te pîroz bikin? 18 Û
milyaketê XUDAN jê re got: Ma
çima tu navê min dipirsî? Ji ber
ku ew nayê salix dayîn. 19 Û Ma-
noah karik û pêşkêşiya nên rahişt
û li ser zinarê pêşkêşî XUDAN
kir û milyaket tiştekî ku şaş dihêle
kir û Manoah û jina wî lê dinihêr-
tin. 20 Ji ber ku dema agir ji ser
pêşkêşîgehê bilind dibû, wusa bû
ku milyaketê XUDAN, tevî agir
hilkişiya û Manoah û jina xwe lê
dinihêrtin û bi ser dev û rû xwe
avêtin erdê.
21 Û milyaketê XUDAN carekî
din ji Manoah û jina wî re nehat
xuyanîbûn. Wê gavê Manoah
fêhm kir ku ew milyaketê XU-
DAN e. 22 Û Manoah ji jina xwe
re got: Muheqeq em ê bimirin, ji
ber ku me Xwedê dît! 23 Û pîreka
wî jê re got: Ger XUDAN bixwes-
ta ku me bukuşta, dê pêşkêşiya
şewitandinê û pêşkêşiya nên ji
destê me ranehişta û hemûya van
tiştan dê nîşanî me nedana û di vê
demê de tiştên mîna vêya nedana
bihîstin. 24 Û pîrek lawekî anî
dinê û navê Şîmşon lê kir û lawik
mezin bû û XUDAN wî pîroz kir.
25 Û di navbera Sora û Eştaolê, li
Mahane-Danê de Ruhê XUDAN
dest pê kir û wî pêş de ajot.

*Zewaca Şîmşon*

5.Mûs 7,3-4; Neh 13,23-37

14 Û Şîmşon daket Tîmnayê û
li Tîmnayê pîrekek ji qîzên
Filistiyan e dît. 2 Û derket û ji
dayik û bavê xwe re gîhand û got:
Li Tîmnayê pîrekek ji qîzên Filis-
tiyan dîtim û niha wê bi jinitî ji
min re bistînin. 3 Û dayik û bavê
wî jê re gotin: Ma qey di nava
qîzên birayên te de an jî di nava
hemûya netewa me de pîrek nîne
ku tu bona ku ji Filistiyên bêsunet
jinê bistînî diçe? Û Şîmşon ji bavê
xwe re got: Wê ji min re bistîne;

1 Bikin mêvan.

2 Bikî mêvan.

ji ber ku ew bi çavê min ve xweş
tête xuyanî kirin. 4 Lê belê dayik
û bavê wî nizanîbûn ku ev ji XU-
DAN e; ji ber ku li dijî Filistiyan
li fersendê digeriya. Û wê demê
Filistî serwerê Îsraêlê bûn.
5 Û Şîmşon, tevî bav û diya xwe
daket Tîmnayê û hatin rezên
Tîmnayê û a vay, şêrek ciwan bi
gurmînî derket hemberê wî. 6 Û
Ruhê XUDAN bihêz hate ser wî
û mîna karikekê bike du parî şêr
kir du parî û tu tiştek di destê wî
de tunebû û kirina xwe ji dayik û
bavê xwe re negot. 7 Û daket û bi
pîrekê re axifî û bi çavê Şîmşon re
xweş hate xuyanî kirin. 8 Û paşî
demekî din, bona ku pîrekê rahêle
vegeriya û bona ku laşê şêr bibîne,
ji rê ve çewt bû û a vay, di laşê şêr
de komikekî mêşa û hungiv hebû.
9 Û hungivê rahişt nav lepên xwe
û dema dimeşiya, xwar û çû û hat
cem bav û dayika xwe û da wan
jî û xwarin û ji wan re negot ku
hungiv ji laşê şêr ve rahiştiye.
10 Û bavê wî daket cem pîrekê û
Şîmşon li wir ziyafetê çêkir; ji ber
ku yên ciwan wusa dikirin. 11 Û
wusa bû ku, dema wî dîtin bona
ku pê re bin, sîh hevalî rahiştin.
12 Û Şîmşon ji wan re got: Niha
ez pirsikekê[1] ji we re bibêjim; ger
hûn di heft rojê ziyafetê de wê bi-
bînin û ji min re bibêjin, ez ê sîh
kincên kitanî û sîh kincên bargirî
bidim we; 13 lê belê ger hûn ji
min re nebêjin, wê gavê hûn ê sîh
kincên kitanî û sîh kincên bargirî
bi min din! Û jê re gotin: Pirsoka[2]
xwe bibêje ku em wê bibihîzin!
14 Û ji wan re got: Ji yê ku dixwe
ve xwarin derket û ji yê xwurt ve
şêranî derket. Û sê roj hêz neanîn
û pirsokê negîhandin.
15 Û wusa bû ku, di roja heftan de
ji pîreka Şîmşon re gotin: Zilamê
xwe bixapîne ku bila pirsokê ji
me re bibêje, ya na em ê te û mala
bavê te bişewitînin! Ma we bona
şêlandinê bangî me kirin, ne wusa
yî? 16 Û pîreka Şîmşon li ber wî
geriya û got: Tu tenê ji min dikeri-
he û ji min hez nake; te pirsokê ji
lawên netewa min re got û te ji min
re negot. Û jê re got: A vay, ma min
ji dayik û bavê xwe re negotiye,
qey ez ê ji te re bibêjim? 17 Û heft
roj, di domahîka ziyafetê de li ber
wî giriya û wusa bû ku, di roja hef-
tan de ji pîrekê re got, ji ber ku zehf
tengasiyê dida wî û pîrek pirsokê
ji lawên netewa xwe re got. 18 Û
zilamên bajêr, di roja heftan de,
berî ku roj biçe ava, ji Şîmşon re
gotin: Ma ji hungivê şêrîn çi heye?
Û ji şêr xwurttir çi heye. Û ji wan
re got: Ger we bi çêleka min a ci-
wan cot neajotibana, we nikarîbûn
pirsoka min bidîtina.

[1] Mamîkekê.

[2] Mamîka.

19 Û Ruhê XUDAN bihêz hate
ser wî û daket Aşkelonê û ji wan
li sîh kesî xist û kincên wan rahişt
û kincên bargirî da yên ku pirsokê
gîhandine. Û hêrsa wî sor bû û
derket mala bavê xwe. 20 Lê belê
jina Şîmşon dan yê ku pê re he-
valtiyê dikir.

*Şîmşon tolê distîne*

15 Lê belê paşî demekî din,
di rojên çinandina genim
de wusa bû ku, Şîmşon tevî ka-
rikekê serîkî da jina xwe û got:
Ez dixwazim têkevim odê, cem
pîreka xwe. Lê belê bavê pîrekê
nehişt ku têkeve hundir. 2 Û bavê
wê got: Bi rastî, ez difikirîm ku tu
bi tûmî jê dikerihe; ji ber vê yekê,
wê dam hevalê te; ma xwuşka wê
yî biçûk, jê hîn jî ne xweşiktir e?
Ez rica dikim, bila dêvla vêya ew
bibe ya te! 3 Û Şîmşon ji wan re
got: Îcar jî ez xerabiyê bi Filisti-
yan re bikim, ez ê ji ber wan bêsûc
bibim. 4 Û Şîmşon çû û sê sed çe-
qel girt û pêtalan rahişt û çeqelan
terî bi teriyan zivirand û pêtalekê
xist nav du teriyan. 5 Û pêtalan
vêxist û berda zadên Filistiyan û
koman û zadan û zeytûngehan jî
şewitandin. 6 Û Filistiyan gotin:
Ma kî vêya kir? Û gotin Şîmşonê
zavayê Tîmnayî kir, ji ber ku jina
wî rahişt û da hevalê wî. Û Filistî
derketin û jin û bavê wê di agir de
şewitandin. 7 Û Şîmşon ji wan re
got: Ger hûn wusa bikin, ez ê mu-
heqeq tolê ji we hildim û paşî wê
ez ê dest bikişînim. 8 Û bi lêxis-
tinekî mezin bitûmî li wan xist û
daket û di quntara zinara Eytamê
de rûnişt.
9 Û Filistî derketin û li Cihûdayê
artêşgehê danîn û li Lehiyê belav
bûn. 10 Û zilamên Cihûda gotin:
Ma çima hûn li dijî me derketin?
Û gotin: Bona ku em Şîmşon girê
bidin û her çi bi me kiribe wusa
bikin derketin. 11 Û ji Cihûdayê
sê hezar kes, daketin quntara zi-
nara Eytamê û ji Şîmşon re gotin:
Ma tu nizanî qey Filistî serwerên
me ne? Û vêya ku tu bi me dikî çi
ye? Û ji wan re got: Wan çi bi me
kiribin, min jî wusa ji wan re kir.
12 Û ji wî re gotin: Em, bona ku
te girê bidin û te bidin destê Filis-
tiyan daketin. Û Şîmşon ji wan re
got: Bona ku hûn ê li min nexin
sondê bidin! 13 Û pê re axifîn û jê
re gotin: Na, lê tenê em ê te girê
bidin û bidin destên wan û em ê
tu carî te nekujin. Û wî bi du benê
nû ve girê dan û wî ji zinarê ve
derxistin.
14 Dema hatin Lehiyê, Filistiyan
derketin pêşiya wan qêriyan û
Ruhê XUDAN bihêz hate ser wî û
benên ku li ser milên wî bûn, bûn
mîna kitana ku di agir de şewitiye
û ben ji destên wî ketin. 15 Û
hestiyekî çenga kerekî ya teze dît
û destê xwe dirêj kir û wê rahişt

û bi wê li hezar kesî xist. 16 Û Şîmşon got: Bi hestiyê çenga ker, komek, du kom, bi hestiyê çenga kerê li hezar kesî xistim!

17 Û wusa bû ku dema axaftinê qedand, hestiyê çengê ji destê xwe ve avêt û ji wê derê re Ramat-Lehî[1] hate gotin. 18 Û zehf tî bû û ji XUDAN re hawar û feryad kir û got: Te, bi destê qûlê xwe vê xelasiya mezin da û niha ez ê ji bêaviyî[2] ve bimirim û bikevim destê bêsunetan! 19 Û XUDAN kortala li Lehiyê yî qelişand û jê av derketin û vexwar û ruhê wî zivirî û vejiya; ji ber vê yekê, navê En-Hakkorê[3] li wir kirin, heta îro jê li Lehiyê ye. 20 Û wî di rojên Filistiyan de bîst salî serweriyê li ser Îsraêlê kir.

*Şîmşon û Delîla*

16 Û Şîmşon çû Gazayê û li wir fahîşekekê dît û ket cem wê. 2 Û ji Gazayiyan re, bi gotina: Şîmşon hate vir, agahî hate dayîn. Û dora wî girtin û di tûmiya şevê de di deriyê bajêr de li dijî wî di kemînê de man û bi gotina: Dema roj hilê em ê wî bukujin, di tûmiya şevê de xwe tev nedan. 3 Û Şîmşon heta nîvê şevê raket û nîvê şevê rabû û bi perîkên deriyê bajêr ve û bi her du sitûnên[4] wê girt û tevî zendê wan ji wir qetand û wan hilgirt ser milên xwe û hilkişand ser çiyayê ku li hemberê Hebronê ye.

4 Û paşî wê wusa bû ku, di newala Sorekê de ji pîrekekê hez kir û navê wê Delîla bû. 5 Û mîrên Filistiyan derketin cem pîrekê û jê re gotin: Wî bixapîne û binêre ka hêza wî ya mezin di ku de ye û bona ku em wî girê bidin û nizm bikin, ka em ê bi çi di ser de derkevin û em ê her yek hezar û sed parî zîvî bidin te. 6 Û Delîla ji Şîmşon re got: Ez rica dikim, ka ji min re bibêje, hêza te di çi de yî û bona nizm kirina te, divê tu bi çi bête girêdan? 7 Û Şîmşon jê re got: Ger min bi heft jîhên[5] ku hişk nebûne girê bidin, ez ê wê gavê lawaz bibim û bibim mîna zilamekî din. 8 Û mîrên Filistiyan, heft jîhên ku hişk nebûne derxistin cem pîrekê û bi wan Şîmşon girê da. 9 Û di oda navîn de zilamên pîrekê ên ku kemînê avêtibûn hebûn. Û pîrek jê re got: Filistiyan hatin ser te ya Şîmşon! Û jîhan, mîna ku têla pirtikê bi agir bikeve çawa dişikê, wusa şikandin. Û quweta wî nehat fêhm kirin.

10 Û Delîla ji Şîmşon re got: A vay, te qerfê xwe bi min re kir û

[1] Gira hestiyê çengê.
[2] Tiyan re.
[3] Çavkaniya kesê ku hawarê dike.
[4] Perikên wê.
[5] Têla kevanê.

te derewan ji min re got! Niha ez
rica dikim, ji min re bibêje, ma
tuyê bi çi bête girêdan? 11 Û jê
re got: Ger bi benên ku di kar de
nehatine şuxulandin min baş girê
bidin wê gavê ez ê lawaz bibim
û bibim mîna zilamekî din. 12 Û
Delîla benên nû rahişt û bi wan ve
Şîmşon girêda û jê re got: Filistî
bi ser te ve hatin ya Şîmşon! Û
yên ku di kemînê de bûn di oda
navîn de rûniştîbûn. Û ji ser milên
xwe, wan mîna ta şikenand.
13 Û Delîla ji Şîmşon re got:
Heta niha te qerfê xwe bi min re
kir û derewan ji min re got! Ka
ji min re bighîne, tuyê bi çi bête
girêdan? Û ji pîrekê re got: Ger
tu heft guliyên serê min, tevî rêsê
birêsînî. 14 Û pîrekê bi sîngê ve
zeximand û jê re got: Filistî bi ser
te ve hatin ya Şîmşon! Û ji xewa
xwe ve hişyar bû û sînga dezgê û
rêsiyê qetand.
15 Û jê re got: Gava dilê te ne bi
min re be, tu çawa: Ez ji te hez
dikim dibêjî? Ev sê car e tu qerfê
xwe bi min re dikî û te ji min re
negot ku ka hêza te yî mezin di çi
de yî. 16 Û wusa bû ku, gava bi
gotinên xwe her roj zorê da wî û
jê re bû ser êşî û canê wî di dereca
mirinê de teng bû. 17 Û hemûya
dilê xwe ji pîrekê re vekir û jê re
got: Guzan bi serê min ve neketi-
ye; ji ber ku ez ji rehma dayikê ve
ji Xwedê re Nezîr im; ger ez xwe
kur bikim, dê wê gavê hêza min ji
min ve biçe û ez ê lawaz bibim[1] û
bibim mîna her zilamekî din.
18 Û gava Delîla dît ku hemûya
dilê xwe jê re vekir, agahî şand û
bangî mîrên Filistiyan kir û got:
Vê demê jî derkevin, ji ber ku
hemûya dilê xwe ji min re vekir.
Û mîrên Filistiyan ji cem pîrekê
ve derketin û zîv di destê xwe de
anîn. 19 Û li ser çongên xwe, wî bi
xewê ve bir û bangî zilamekî kir û
heft guliyên serê wî da kur kirin
û dest bi nizmkirina wî kir û hêza
wî ji ser wî ve çû. 20 Û pîrekê
got: Filistî bi ser te ve hatin; ya
Şîmşon! Û ji xewa xwe hişyar bû
û got: Mîna derbên din ez ê xwe
hilweşînim û derkevim. Lê belê
nizanîbû ku XUDAN jê veqeti-
ya ye. 21 Û Filistiyan pê girtin û
çavên wî derxistin û wî daxistin
Gazayê û bi zincîrên tûncî ve wî
girêdan û di girtîgehê de aşê dizi-
virand. 22 Û paşî ku kur bû, porê
serê wî dest bi dirêjbûnê kirin.

*Mirina Şîmşon*

23 Û mîrên Filistiyan, bona ku ji
îlahên xwe Dagon re qurbanekî
mezin serjê bikin û şahiyê bikin, ci-
viyan û gotin: Îlahê me, neyarê me
Şîmşon da destê me. 24 Û netewê
wî dîtin û şikiryê ji îlahê xwe re ki-
rin; ji ber ku gotin: Îlahê me, neyarê

1 Bikevim.

me yê ku welatê me xera kiriye û ji
me pirr kesan kuştiye da destên me.
25 Û wusa bû ku, dema dilên wan
kêfxweş bûn, gotin: Bangî Şîmşon
bikin ku bila me kêfxweş bike. Û
ji girtîgehê bangî Şîmşon kirin û li
ber wan lîst. Û wî di nava sitûnan
de sekinandin. 26 Û Şîmşon ji xortê
ku bi destê wî ve girtiye re got: Min
berde ku ez destê xwe di sitûnên ku
mal li ser sekinîne de bidim û xwe
bisipêrim wan. 27 Û xanî bi jin û
mêran ve tijî bû û hemû mîrên Fi-
listiyan li wir bûn û qasî sê hezar
zilam û pîrek ên ku lîstika Şîmşon
temaşe dikirin li ser xanî bûn.
28 Û Şîmşon ji XUDAN re feryad
kir û got: Ya Xudan, XUDAN, ez
lava dikim, min di bîra xwe de
bîne û ez lava dikim, tenê vê carê
ya Xwedê, min xwurt bike û ez ji
Filistiyan, bona her du çavên xwe
di derbikê de tolê bistînim! 29 Û
Şîmşon her du sitûnên navîn, ên
ku xanî li ser sekiniye girt û bi
wan, bi destê xwe yî rastê bi yekî
û bi destê xwe yî çepê jî yê din ve
sipart. 30 Û Şîmşon: Ez jî tevî Fi-
listiyan bimirim! got. Û bi hemû
quweta xwe xwar bû û xanî bi ser
mîran û bi ser hemû netewa ku
têdebûn ve ket. Û miriyên ku di
mirina xwe de kuştibûn, ji yên ku
di jiyana xwe de kuştibûn zêdetir
bûn. 31 Û birayên wî û hemû ma-
liyê bavên wî daketin û wî rakirin
û derxistin û wî di navbera Sora û
Eştaolê de, di gora bavê wî Ma-
noah de binax kirin. Û wî bîst salî
serweriyê li Îsraêlê kiribû.

*Pûtên Mîka*

17 Û ji çiyayiya Efrayîmê zi-
lamek hebû û navê wî Mîka
bû. 2 Û ji dayika xwe re got: Ji
ber hezar û sed parî zîvên ku ji te
hatine dizîn, te naletê lêanî û wê
bi min ve da bihîstin, a vay, ew
zîv bi min re ye; ez wê rahiştim.
Û dayika wî got: Lawê min, bila
ji aliyê XUDAN ve pîroz be! 3 Û
hezar û sed parî zîvî şunda da diya
xwe û diya wî got: Bona ku pûtekî
qewartî û yekî rijandî çêbikim,
zîvê bona lawê xwe, ji aliyê xwe
ve bitûmî ji XUDAN re pîroz ki-
ribûm û niha ez ê wê şunda bidim
te. 4 Û dema zîv şunda da diya
xwe, diya wî du sed parî zîv rahişt
û wan da zêrkar û wan kirin pû-
tekî qewartî û pûtekî rijandî û li
mala Mîka bû. 5 Û Mala Mîka ya
îlahan hebû û efode û terafîm çê-
kir û bona lawekî xwe tirxan kir û
bû kahinê wî. 6 Di wan rojan de li
Îsraêlê qiral tunebû; her kes yê ku
di çavê xwe de rast e, dikir.
7 Û ji Beytlehem-Cihûdayê, ji nî-
jada Cihûda zilamekî ciwan hebû
û ew Lêwiyî bû; li wir mêvan
bû. 8 Û ew zilama bona li cîhê
ku bibînî bibe mêvan, ji Beytle-
hem-Cihûdayê, ji bajêr ve çû û
dema rêwîtiyê dikir hate çiyayiya

Efrayîmê, mala Mîka. 9 Û Mîka jê re got: Tu ji ku derê tê? Û jê re got: Ez Lêwiyiyek ji Beytlehem-Cihûdayê me û bona li cîhê ku bibînim bibim mêvan diçim. 10 Û Mîka jê re got: Bi min re rûne û ji min re bibe bav û kahîn û ez ê salê deh parî zîv û qatekî kinc û xwarina te bidim te. Û yê Lêwiyî pê re çû. 11 Û Lêwiyî bi wî zilamî re rûniştinê razî bû û zilamê ciwan, jê re bû mîna yek ji lawên wî ne. 12 Û Mîka yê Lêwiyî tirxan kir û zilamê ciwan bû kahînê wî û li mala Mîka bû. 13 Û Mîka got: Niha ez dizanim ku dê XUDAN qenciyê bi min re bike, ji ber ku yekî Lêwiyî ji min re bû kahîn.

*Lawên Dan li Laîşê bicîh dibin*

Yêşû 19,40-47; Serw 17; Îşa 45,20

18 Di wan rojan de li Îsraêlê qiral tunebû û di wan rojan de nîjada Daniyan, bona ku rûnin, ji xwe re li mêrasê digeriyan; ji ber ku heta wê rojê di nava nîjadên Îsraêlê de jê re mêras neketibû. 2 Û lawên Dan, bona ku cahşitiyê[1] ji welêt re bikin û bona ku lêkolînê bikin, ji eşîrên xwe, ji hemû hejmarên xwe, ji Sora û ji Eştaolê pênc zilamî, egîdên dilawêr şandin û ji wan re gotin: Herin, lêkolînê li welêt bikin. Û ew hatin çiyayiya Efrayîmê, mala Mîka û li wir şevbuhurka xwe kirin. 3 Û dema li cem mala Mîka bûn dengê zilamê ciwan, yê Lêwiyî nas kirin û ber bi wê derê çûn û jê re gotin: Kî te anî vê derê? Û tu li vê derê çi dikî? Û çiyî te li vê derê heye? 4 Û ji wan re got: Mîka vana ji min re kir, bi heqê xwe min girt û ez bûm kahînê wî. 5 Û jê re gotin: Em rica dikin, ji Xwedê bipirse, da ku, rêya em li ser diçin dê ji me re bi oxir be em pê bizanibin. 6 Û kahîn ji wan re got: Bi xweşiyê herin; rêya ku hûn tê de diçin, li ber XUDAN e!

7 Û her pênc zilam çûn û gîhaştin Laîşê û netewa ku tê de ye dîtin ku bêxem bûn û li gor kevneşopa Saydayiyan biaram û ewle bûn û li welêt, tu xwedî daraziyek, yê ku di karekî de zorê bide wan, tune bû û ew ji Saydayiyan dûr bûn û bi tu kesî re karekî wan tune bû. 8 Û hatin Sora û Eştaolê, cem birayên xwe û birayên wan ji wan re gotin: Ka we çi kirin? 9 Û gotin: Rabin û em li hember wan derkevin; ji ber ku me welêt dîtin û a vay, zehf qenc e. Ma hûn hîn li cîhê xwe disekinin? Di çûna bona ku welat bi milkî girtinê de û di ketina wir de hûn teraliyê mekin. 10 Dema hûn herin, hûn ê bigihêjin ser neteweyek bêxem û welat ji her alî ve fireh e; ji ber ku Xwedê wê daye destên we, cîhekî wusa ye ku heçî tiştên ku li dinê ne li wir ne kêm in.

1 An jî: Sîxuriyê.

11 Û ji wir, ji Sora û Eştaolê, ji
nîjada Daniyan şeş sed kesên ku
çekên cengê li xwe xemilandine
koç kirin. 12 Û derketin û li Cihû-
dayê, li Kîryat-Yearîmê koç danîn;
ji ber vê yekê heta îroj ji wê derê
re Mahane-Dan tête gotin; a vay,
li paşî Kîryat-Yearîmê ye. 13 Û
ji wir derbasî çiyayiya Efrayîmê
bûn û hatin mala Mîka.
14 Û pênc zilamê ku bona sîxuriyê
li welatê Laîşê bikin, bersivê dan
û ji birayê xwe re gotin: Ma hûn
dizanin di van xaniyan de efod û
terafîm û pûtê qewartî û pûtê ri-
jandî hene? Û niha hûn biryarê
bidin, ka hûn ê çi bikin. 15 Û ber-
bi wir ve çûn û hatin mala zilamê
ciwan, mala yê Lêwiyî, hatin mala
Mîka û hal û xatirê wî pirsîn. 16 Û
ji lawên Dan, şeş sed zilamên ku
çekên cengê li xwe kiribûn, di cîhê
ketina derî de sekinîn[1]. 17 Û pênc
zilamê ku bona sîxuriyê li welêt
bikin çûbûn, derketin û ketin wir
û pûtê qewartî û efod û terafîm û
pûtê rijandî rahiştin, kahîn jî li cem
şeş sed zilamên ku çekên cengê
li xwe kiribûn, li cîhê ketina derî
de sekinîbû. 18 Û gava ew ketin
mala Mîka û pûtê qewartî û efod û
terafîm û pûtê rijandî anîn, kahîn ji
wan re got: Hûn çi dikin? 19 Û jê
re gotin: Hiş be! destê xwe deyne
ser devê xwe û bi me re were û ji
me re bibe bav û kahîn; ma ji zila-
mekî re kahînbûn an jî di Îsraêlê de
ji eşîrekê û ji nîjadekê re kahînbûn
bona te qenc e? 20 Û dilê kahîn
kêfxweş bû û efod û terafîm û pûtê
qewartî rahişt û di navbera netewê
de meşiya.
21 Û vegeriyan û çûn û zarokan û
heywanan û pertalan danîn ber xwe.
22 Dema ew ji mala Mîka ve bi dûr
ketin, zilamên ku di malên li cem
mala Mîka ne de civiyan û gîhaştin
lawên Dan. 23 Û bangî lawên Dan
kirin. Û wan wecê xwe zivirandin
û ji Mîka re gotin: Ma çiyî te heye
ku tu civiya? 24 Û got: We kahîn û
îlahên ku çêkirime rahiştin û birin û
êdî ji min re çi ma? Ma çawa hûn ji
min re dibêjin: Çiyî te heye? 25 Û
lawên Dan jê re gotin: Bila dengê
te di nava me de neyê bihîstin, ya
na zilamên ku canên wan şewitiye
dê bikişin ser we û tuyê canê xwe
û canên gelên maliyên xwe winda
bike! 26 Û lawên Dan bi rêya xwe
ve çûn û dema Mîka dît û ew ji wî
xwurttir in ziviri û çû mala xwe.
27 Û ew, tiştên ku Mîka çêkirine
û kahînê wî rahiştin û hatin Laîşê,
cem neteweyek biaram û pêewle
û wan dan ber şûrên xwe û agir
bi bajêr ve xistin. 28 Û xelasker
tunebû; ji ber ku ew ji Saydayê
dûr bûn û tu karên wan bi kesekî
re tunebû û di newala ku li cem
Beyt-Rehobê bû. Û bajêr ava kirin
û tê de rûniştin. 29 Û li gor navê

[1] Bi cîh bûn.

bapîrê xwe Dan, yê ku ji Îsraêlê
hatiye dinê, navê Dan li bajêr ki-
rin; lê belê di destpêkê de navê ba-
jêr Laîş bû. 30 Û lawên Dan pûtê
qewartî bona xwe çikandin û heta
ku welêt birin sirgûnê, Yonatanê
lawê Gerşomê, lawê Mûsa, ew bi
xwe û lawên wî ji nîjada Daniyan
re bûn kahîn. 31 Û di hemû rojên
ku mala Xwedê li Şîloyê bû de
pûtê qewartî yê ku Mîka çêkiribû,
bona xwe çikyayî[1] hiştin.

*Lêwiyî û Cariya wî*

19
Û wusa bû ku, di wan rojên
ku li Îsraêlê qiral tunebû
de, Lêwiyiyekê ku di paşî çiyayi-
ya Efrayîmê de mêvanî hebû û ji
Beytlehem-Cihûdayê, cariyekê ji
xwe re stend. 2 Û cariya wî, li dijî
wî zinê kir û ji cem wî çû Beytle-
hem-Cihûdayê, mala bavê xwe û
qasî çar mehî li wir ma. 3 Û mêrê
wê rabû û bona ku ji dilê wê re bi-
bêje û pîrekê şunda bîne, li pêy wê
çû û li cem wî, tevî xulamê wî du
heb ker hebûn û pîrekê wî anî mala
bavê xwe û gava bavê pîreka ciwan
wî dît, bi kêfxweşiyê derket pêşiya
wî. 4 Û xezûrê wî, bavê pîreka ci-
wan dest da ser wî û sê roj pê re
rûnişt û xwarin û vexwarin û li wir
şevîniya xwe kirin. 5 Û wusa bû
ku, roja çaremîn, sibehê zû rabûn
û zilam, bona ku here rabû û bavê
pîreka ciwan ji zavê xwe re got: Bi
pariyekî nan, dilê xwe bizexmîne û
paşî wê hûn ê biçin. 6 Û rûniştin û
her du pev re xwarin û vexwarin û
bavê pîreka ciwan ji zilam re got:
Ez rica dikim, bona şevbuhurkê
razî bibe û bila dilê te xweş be! 7 Û
zilam, bona ku here rabû ser pêlan
û xezûrê wî zorê da wî û rûnişt û
dîsa şeva xwe li wir derbas kir.
8 Û roja pêncan bona ku here, sibehê
zû rabû û bavê pîreka ciwan got:
Ez rica dikim, dilê xwe bizexmîne
û heta ku roj biqede kêfxewşiyê
bikin! Û her du jî xwarinê xwarin.
9 Û gava zilam, cariya wî û xulamê
wî bona ku biçin rabûn, xezûrê wî,
bavê pîreka ciwan jê re got: A vay,
roj dighêje êvarê, ez rica dikim,
şeva xwe li vir biborînin; a vay, roj
li ber qedandinê ye, şevê li vir bi-
borîne û bila dilê te şa bibe û sibê
tuyê zû bi rêya xwe ve biçî û bi-
gihêjî çadira xwe!
10 Lê belê zilam nexwest ku şeva
xwe biborîne û rabû û çû û gîhaşt
hemberê Yebûsê, ew Orşelîm e û
tevî wî du kerên bi cilik hebûn;
cariya wî jî li cem wî bû. 11 Hîn
ew nêzîkî Yebûsê bûn, roj hema
hema çûbû ava[2] û xulam ji efen-
diyê xwe re got: Ez rica dikim,
were û em berbi vî bajarê Yebûsi-
yan çewt bibin û şeva xwe li wir
biborînin. 12 Û efendiyê wî jê re

1 Çikandî.
2 An jî: Roj zehf daketibû.

got: Em bi bajarê ku yê biyanên ne
ji lawên Îsraêlê ne, çewt nebin; lê
belê em ê derbasî Gîbeayê bibin.
13 Û ji xulamê xwe re got: Were
em nêzîkî ji van cîhan yekî bibin
û em ê li Gîbeayê an jî li Ramayê
şeva xwe biborînin. 14 Û derbas
bûn û çûn û gava nêzîkî bajarê
Gîbeaya Benyamîn bûn, roj li ser
wan çû ava. 15 Û bona ku bike-
vin Gîbeayê û li wir şeva xwe bi-
borînin, bi wir ve çewt bûn û ew
ket û di qada bajêr de rûnişt û ji
ber, bona ku şeva xwe biborînin,
tu kes wan nedigirtin malên xwe.
16 Û a vay, zilamekî kal bûyî,
êvarê ji beyarê, ji karê xwe ve
dihat û zilam ji çiyayiya Efrayîm
bû û li Gîbeayê mêvan bû; lê belê
gelên wê derê Benyamînî bûn.
17 Û çavên xwe rakirin û di qada
bajêr de rêwî dît û zilamê kalbûyî
got: Tu diherî ku derê û tu ji ku
derê ve tê? 18 Û jê re got: Em
ji Beytlehem-Cihûdayê, derbasî
aliyên li paşî çiyayiya Efrayîm
dibin; ez ji wir im û çûm Beyt-
lehem-Cihûdayê û niha ez diçim
mala XUDAN û kesî ku min bi-
gire mala xwe nîne. 19 Bi rastî
bona kerên me ka jî heye; êm jî
heye; bona min û bona cariya min
û bona xulamê ku li cem qûlên te
ne nan û xemr jî hene; qet tu tiştek
ne kêm e. 20 Û zilamê kalepîr got:
Bila xweşî li te be! Lê belê bila
hemû motajiya te li ser min be; lê
li qadê şevê neborîne! 21 Û wî anî
mala xwe û êm da keran û lingên
xwe şuştin û xwarin û vexwarin.
22 Hîn wan dilên xwe xweş dikirin,
a vay, zilamên bajêr, kesên bêkêr
dora xanî girtin û li derî xistin û ji
zilamê kalbûyî; ji xwediyê malê re
gotin: Ew zilamê ku hatiye mala te
derxîne, ku em pê bizanibin! 23 Û
zilam, xwediyê malê bi wan ve pe-
kiya û ji wan re got: Na birayên min,
ez rica dikim, xerabiyê nekin; ma-
dem ku ev zilam hate mala min, vê
kêmitiyê mekin! 24 A vay, qîza min
ya nezewiciye û cariya wî zilamî;
niha ez wan derxim ku hûn wan
nizm bikin û tiştê ku di çavên we
de qenc e, ji wan re bikin; lê belê ji
vî zilamî re nemerdiyek[1] wusa me-
kin! 25 Lê belê zilaman nexwestin
ku wî guhdarî bikin û zilam bi cari-
ya xwe ve girt û derxist derve, cem
wan û wan dest avêtin namûsa wê[2]
û di tûmiya şevê de, heta sibehê bi
xerabî lê kirin û dema berbang avêt,
wê berdan. 26 Û pîrek di rojhilatê
de hat û li ber deriyê mala zilam, ya
ku efendiyê wê lê bû; heta der û dor
ronî bû, ket û ma.
27 Û efendiyê wê sibehê rabû û
deriyên malê vekir û bona ku bi
rêya xwe ve biçe, derket û a vay,
pîrek, cariya wî, di deriyê malê

[1] Adîtiyek.

[2] An jî: Bi wê fêr bûn.

de ketibû û destên wê li ser derzanê bûn. 28 Û jê re got: Rabe ku em herin! Lê belê kesî ku bersivê bide tunebû û wê hilgirt ser kerê û zilam rabû û çû cîhê xwe. 29 Û gava gîhaşt mala xwe, kêrekê rahişt û bi cariya xwe ve girt û wê li gor hestiyên wê kir donzdeh parî û wê[1] ji hemû sînorên Îsraêlê re şand. 30 Û wusa bû ku, her yê ku dît, got: Ji roja ku lawên Îsraêl ji Misirê derketine heta îroj, tiştekî wusa nebûye û nehatiye dîtin; li ser vêya bifikirin, şîretan bidin hev û biaxifin!

*Şerê li dijî Lawên Benyamîn*

20 Û hemû lawên Îsraêl derketin û ji welatê Gîleadê û ji Danê heta Beer-Şebayê civat mîna tenê zilamek be, di Mîtspayê de, li ber XUDAN civiyan. 2 Û pêşhatiyên hemûya netewê, ên ezbetên Îsraêl, di civaka komela Xwedê de amade bûn, çar sed hezar peyayên ku şûr dikişînin. 3 Û lawên Benyamîn bihîstin ku lawên Îsraêl derketine Mîtspayê. Û lawên Îsraêl gotin: Bibêjin, ev xerabî çawa çêbû? 4 Û Lêwiyî, mêrê pîreka ku hatiye kuştin bersivê da û got: Ez û cariya xwe, bona şevbuhurkê, ketin bajarê Gîbea, ya ku Benyamîn e. 5 Û mêrên Gîbeayê li dijî min rabûn û li dijî min, şevê dora xanî girtin; kuştina min fikirîn û cariya min nizm kirin û pîrek mir. 6 Û bi cariya xwe girtim û wê bi pariyan ji hev jêkirim û wê şandim hemû beyarên ku mêrasa Îsraêlê ne; ji ber ku di Îsraêlê de canîtî û rezîltiyê kirin. 7 Ya lawên Îsraêl! A vay, hûn gişt li vir şîret û ramanên xwe bidin.

8 Û hemûya netewê, mîna ku yek zilamekî bin rabûn û gotin: Dê ji me tu kes neçe çadira xwe û tu kes venegere mala xwe. 9 Niha, tiştê ku em bi Gîbeayê ve bikin ev e; em ê bi pişkê li dijî wê derkevin 10 û bona ku ji netewê re xwarinê bînin, li gor hemû nîjadên Îsraêlê, ji sed kesî dehî û ji hezarî sed û ji deh hezarî jî hezar zilam bistînin û gava ew werin bajarê Gîbeayê ya Benyamîn, bila li gor giştika kêmitiya ku wî li Îsraêlê kiriye bikin. 11 Û hemûyê Îsraêlî, mîna ku zilamekî bin, li dijî wî bajarî civiyan.

12 Û nîjadên Îsraêlê, zilaman ji hemû nîjadên Benyamîn re şandin û gotin: Ev xerabiya ku di nava we de tête çêkirin çi ye? 13 Û niha wan zilamên nizm, ên ku li Îsraêlê ne bidin ku em wan bukujin û xerabiyê ji Îsraêlê bavêjin. Lê belê Benyamîn nexwest ku gotinên birayên xwe, yên lawên Îsraêl guhdarî bike. 14 Û bona ku li dijî lawê Îsraêl derkevin cengê, lawên Benyamîn ji bajaran hatin û li Gîbeayê civiyan. 15 Û wê rojê, xeynî heft sed zilamên bijartî ên

1 An jî: Wan perçeyan.

ku ji bajarê Gîbeayê ve hatine
hesibandin, lawên Benyamîn ên ku
ji bajarên din ve hatine, bîst û şeş
hezar kesên ku dikarin şûr bikişînin
hatin jimartin. 16 Ji hemûya vê
netewê, heft sed çepokên bijartî
hebûn; her yek bi qûsikê dikarîbû
kevir bavêta mûyê û şaş nedibû.
17 Û xeynî Benyamîniyan, yên
Îsraêlî, çar sed hezar kesên ku di-
karin şûr bikişînin hatin hesiban-
din; hemû vana zilamê cengê bûn.
18 Û lawên Îsraêl rabûn û
hilkişiyan Beytelê û ji Xwedê ve
pirsîn û gotin: Dê kî pêşiyê derke-
ve ku li dijî lawên Benyamîn bona
me cengê bike? Û XUDAN got:
Dê pêşiyê Cihûda derkeve!
19 Û lawên Îsraêl sibehê rabûn û
li dijî Gîbeayê artêşgehê danîn.
20 Û Îsraêlî, bi Benyamîn re derke-
tin[1] cengê û Îsraêlî li hember wan,
li Gîbeayê, ji cengê re rêz bûn.
21 Û lawên Benyamîn ji Gîbeayê
derketin û wê rojê ji Îsraêliyan bîst
û du hezar kesî li erdê dirêj kirin.
22 Û netewe, yên Îsraêlî dilawêr
bûn û li cîhê ku rojekê berê bona
cengê rêz bûbûn, dîsa rêz bûn.
23 Û lawên Îsraêl derketin û li
ber XUDAN heta êvarî giriyan û
ji XUDAN ve pirsin û gotin: Ma
em dîsa bi birayên xwe lawên
Benyamîn re bikevin cengê? Û
XUDAN: Li dijî wê derkevin, got.
24 Û roja duwemîn, lawên Îsraêl
nêzîkî lawên Benyamîn bûn. 25 Û
roja duwemîn Benyamîn li dijî wan
ji Gîbeayê derket û dîsa ji lawên Îs-
raêl ve hîjdeh hezar kesî li erdê ve
dirêj kirin; hemûyên vana, ên ku
şûr dikişandin bûn. 26 Û hemûya
lawên Îsraêl, hemûya netewê der-
ketin, hatin Beytelê û giriyan û li
wir, li ber XUDAN rûniştin û wê
rojê heta êvarê rojî girtin û li ber
XUDAN pêşkêşiyên şewitandinê
û pêşkêşiyên xweşiyê pêşkêş ki-
rin. 27 Û lawên Îsraêl ji XUDAN
re pirsîn: Ji ber ku Sindoqa Xwedê
ya Peymanê di wan rojan de li wir
bû 28 û Fînehasê lawê Eleazarê,
lawê Harûn di wan rojan de li ber
wê disekinî û got: Gelo em dîsa li
dijî birayên xwe lawên Benyamîn
derkevin cengê, an dê em dev jê
berdin? Û XUDAN got: Derke-
vin; ji ber ku ez ê sibê wan bidim
destên we.
29 Û Îsraêl, ên ku kemînê avêtibûn
li hember Gîbeayê bi dor û ber
danîn. 30 Û roja sêwemîn, lawên
Îsraêl derketin pêşiya lawên Ben-
yamîn û mîna carên din, li hem-
ber Gîbeayê rêz bûn. 31 Û lawên
Benyamîn derketin pêşiya netewê
û ji bajêr ve dûr vekişiyan û li ser
rêyên mezin, ên ku yek derdike-
ve Beytelê û yek jî ji beyarê ve
diçe Gîbeayê, mîna carînên din,
dest bi lêxistina netewê kirin û
ji Îsraêliyan, qasî sîh kesî kuştin.

[1] An jî: Rabûn.

32 Û lawên Benyamîn gotin: Mîna berê li pêş me hatin lêxistin, lawên Îsraêl jî gotin: Em birevin û wan ji bajêr ve bikişînin rêyên mezin! 33 Û hemû Îsraêlî ji cîhên xwe rabûn û li Baal-Tamarê rêz bûn û ji Maare-Gebayê, ji Îsraêliyan, ên ku kemîn danîbûn, ji cîhê xwe ve derketin. 34 Û ji hemûya Îsraêlê, deh hezar kesên bijartî hatin hember Gîbeayê û ceng dijwar bû, lê belê fêhm nekirin ku xerabî gîhaştiye wan. 35 Û XUDAN, li ber Îsraêlê li Benyamîn xist û ew roj lawên Îsraêl ji Benyamînê bîst û pênc hezar û sed kesî helaq kirin; hemûyên vana, ên ku şûr kişandine bûn.

36 Û lawên Benyamîn lêxistina xwe dîtin; Îsraêlî jî qadê dabûn Benyamîniyan, ji ber ku bi yên ku li hember Gîbeayê xistibûn kemînê ewle dibûn. 37 Û yên ku kemînê avêtibûn, lez kirin û êrîşî Gîbeayê kirin û yên ku kemînê danîbûn bi dorê ve belav bûn û hemûya bajêr ji şûr ve derbas kirin. 38 Û nîşana di nava Îsraêlî û yên ku kemînê avêtibûn de, ji bajêr ve ewra duhekî mezin derxistina wan bû. 39 Û Îsraêlî di cengê de şunda vegeriyan[1] û Benyamînî dest bi lêxistinê kirin û ji Îsraêliyan, qasî sîh kesî kuştin; ji ber ku gotin: Bi rastî jî mîna cengê berê, li ber me hatin lêxistin. 40 Lê belê dema ji bajêr, mîna sitûna duh, ewr derketin, Benyamînî li paşî xwe nihêrtin û a vay, şewata hemû bajêr digihêşt ezman. 41 Û Îsraêlî zivirîn û Benyamînî şaş bûn; ji ber, dîtin ku xerabî gîhaştiye wan. 42 Û ji ber Îsraêliyan, berbi rêya çolê ve şunda reviyan; lê belê ceng gîhaşt wan û yên ku ji bajêr ve derketin wan di nav xwe de helaq kirin. 43 Dor li Benyamîniyan girtin, bera pêy wan dan û ber bi rojhilatê ve heta hember Gîbeayê di cîhên konaxê de wan eciqandin[2]. 44 Û ji Benyamînê hîjdeh hezar kes ketin; hemûyên vana egîdên dilawêr bûn. 45 Û zivirîn û reviyan çolê, zinarê Rîmon û di rêyên mezin de ji wan pênc hezar kesî dan hev û heta Gîdomê bi pêy wan zeliqîn û ji wan li du hezar kesî xistin. 46 Û wê rojê, hemûyên ku ji Benyamînê ketine, bîst û pênc hezar kesên ku şûr dikişandin bûn; hemûyên vana egîdên mêrxas bûn. 47 Û şeş sed kes zivirîn û reviyan çolê, zinarê Rîmmon û çar meh li zinarê Rîmmon ve rûniştin. 48 Û Îsraêlî dîsa li dijî lawên Benyamîn ve zivirîn û wan û hemûya bajêr û heywanan û hemûyên ku dîtin ji şûr ve derbas kirin û agir bi hemû bajarên ku li pêşiya xwe ne ve dadan.

1 Dev jê berdan.

2 Cûtin.

*Zewicandina Lawên Benyamîn*

21 Û Îsraêliyan, bi gotina: Dê ji
me tu kes, qîza xwe bi jinitî
nede Benyamîn li Mîtspayê sondê
dabûn. 2 Û netewe hat Beytelê
û li wir, heta êvarê li ber Xwedê
rûniştin û bi dengê bilind giriyan.
3 Û gotin: Ya Xwedayê Îsraêl
XUDAN, çima ev tişt di Îsraêlê de
derket û îroj nîjadek ji Îsraêlê kêm
bû? 4 Û dotira rojê netewe zû rabûn
û li wir pêşkêşîgehekê ava kirin.
û pêşkêşiyên şewitandinê û yên
xweşiyê pêşkêş kirin. 5 Û lawên
Îsraêl gotin: Ji hemû nîjadên Îsraêlê
ve yê ku di civînê de ji XUDAN
re derneketiye kî ye? Ji ber ku ji
Mîtspayê, di derheqê zilamê ku
ji XUDAN re dernekeve de, bi
gotina: Dê muheqeq bête kuştin!
sonda mezin dabûn. 6 Û lawên
Îsraêl ji ber birayên xwe Benyamîn
bi jan ketin û gotin: Îro ji Îsraêlê
nîjadek hate qetandin! 7 Em bona
wan, bona yên ku ji ber wan mane
jinê bibînin çi bikin? Ji ber, me
bona mafê XUDAN sondê dan ku
em ji qîzên xwe, bi jinitî nadin wan.
8 Û gotin: Ji hemû nîjadên Îsraêl,
yê ku derneketiye Mîtspayê, ji
XUDAN re derneketiye kî heye?
Û a vay, ji Yabeş-Gîleadê kes
nehatibûn civînê, artêşgehê. 9 Û
dema netewe hate jimartin, a vay,
li wir, ji gelê Yabeş-Gîleadê tu kes
nehat dîtin. 10 Û civak, ji zilamên
xwe yên herî bêtirs donzdeh he-
zar kes şandin û emir dan wan
û ji wan re gotin: Herin û gelên
Yabeş-Gîleadê, pîrekan û zarokan
ji şûr ve derbas bikin! 11 Û tiştê
ku hûn ê bikin ev e: Divê hûn her
zilamî û her pîreka ku bi zilam re
raketiye, bitûmî tune bikin. 12 Û
di nava gelê Yabeş-Gîleadê de çar
sed qîzên ku nezewicîne dîtin û
wan anîn artêşgeha li Şîloya ku di
welatê Kenanê de ye.
13 Û hemûya civakê, ji lawên Ben-
yamîn ên ku li zinara Rîmmonê ne
re zilam şandin û axifîn û wan bangî
aşitiyê[1] kirin. 14 Û wê gavê Ben-
yamîn vegeriya û ji pîrekên Yabeş-
Gîleadê, pîrekên ku sax hiştibûn
dan wan; lê tevî wusa bûnê, têra
wan nekirin. 15 Û netewe ji ber
Benyamîn, bi heyfê ve ketin, ji ber
ku XUDAN di nava nîjadên Îsraêl
de neqebekê vekiribû.
16 Û kalepîrên civakê gotin: Ma
em bona ku jinê ji yên ku mane
re bibînin, çi bikin? Ji ber ku ji
Benyamîn, pîrek hatin helaq kirin.
17 Û gotin: Bona ku neteweyek ji
Îsraêlê winda nebe, divê ji yên ku
ji ber Benyamînê mane re mêras
hebe. 18 Û em ji qîzên xwe jinan
nadin wan; ji ber ku lawên Îsraêl,
bi gotina: Yê ku jinê bide lawên
Benyamîn, bila bi nalet be! son-
dê dabûn. 19 Û gotin: A vay, li
bakura Beytelê, di rojhilata rêya

[1] Li hev hatinê.

mezin de ya ku ji Beytelê derdi-
keve Şekemê û Şîloya ku li başûrê
Lebonayê ye ji salê heta salê cej-
na XUDAN heye. 20 Û emir dan
lawên Benyamîn û gotin: He-
rin û di rezan de têkevin kemînê
21 û binêrin û a vay, ger qîzên
Şîlo, bona ku bireqisin derkevin,
wê gavê ji rezan derkevin û bona
xwe, bila ji we her yek, ji qîzên
Şîloyê, bona ku ji xwe re bike jin
bigire û herin welatê Benyamînê!
22 Û dê wusa bibe ku dema bavên
wan an jî birayên wan, bona gilî-
kirê werin cem me, em ê ji wan re
bibêjin: Wan ji me re biborînin; ji
ber ku me ji cengê, bona her yekî
jinekê nestendin, we jî nedan wan;
ya na hûn ê niha bisûc bibûna!
23 Û lawên Benyamîn wusa kirin
û li gor hejmara xwe, ji yên ku di-
reqisin girtin û birin û çûn û vege-
riyan mêrasên xwe û bajaran ava
kirin û di wan de rûniştin. 24 Û wê
gavê lawên Îsraêl ji wir her yek çû
nîjada xwe û eşîra xwe û her yek
hilkişiyan mêrasa xwe.
25 Di wan rojan de li Îsraêlê qiral
tunebû; her kesi tiştê ku di çavê
xwe de rast e dikir.

# RÛT

*Pêşgotin*

Çîroka Rût, di dema tundiya di wexta serweran de didome de derbas dibe. Rût ji gelê Moabê, yên ku mîna gelê Xwedê nayên hesibandin bû. Bi Îsraêliyek ji ber xelayê li Moabê bi cîh dibe re dizewice. Paşî ku mêrê wê dimire, Rût, bi dilsoziyek bêmînak bi xwesiya xwe Naomî ve û bi hestek bêmînak ya xwenezîrkirine jî bi Xwedayê Îsraêlê ve tête girêdan. Ya dawîn bi merivekî mêrê xwe re dizewice û bi vî awayî dibe dayika kalê Dawidê qiralê herî mezin yê Îsraêlê ye.

Bûyerên di pirtûka Serweran de derbas dibin, bêtariyên ku hatiye serê Îsraêliyên bêîtaetê ji Xwedê re kirine, dide ber çavan. Çîroka Rût jî bereketên biyanekî vedigere Xwedê sitendiye, pêşkêş dike.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-22 | Naomî tevî Rût vedigere Beytlehemê |
| 2:1-3:18 | Rût û Boaz rastî hev tên |
| 4: 1-22 | Zewaca Rût û Boaz |

*Xela û Koçbarî*

1 Û wusa bû ku, di rojên ku ser-
weran hikumraniya xwe dido-
mandin de, li welêt[1], xela dest pê
kir. Zilamek ji Beytlehema ku ba-
jarê Cihûda ye, tevî jin û du lawên
xwe, bona demekî derbasî bimîne,
ber bi axên Moabê ve bi rê ket.
2 Navê zilam Elîmelek, navê jina
wî Naomî, navên lawên wî jî Mah-
lon û Kîlyon bûn. Van kesên ku ji
Beytlehema ku bajarê Cihûda ye û
ji nîjada Efronê ne, çûn axa Moabê
û li wir, dest bi jiyana xwe kirin.
3 Naomî, gava mêrê wê Elîmelek
mir, bi her du lawên xwe ve tenê
ma. 4 Her du law, ji qîzên Moabê
ve bona xwe jinan stendin. Navê
yekî Orpa û navê ya din jî Rût bû.
Piştî ku qasî deh salî li wir jiyana
xwe domandin, 5 Mahlon jî, Kîl-
yon jî mirin. Bi vî awayî, pireka[2]

[1] Îsraêlê.

[2] Naomî.

ku tevî zilamê xwe her du lawên
xwe winda kiriye, tenê ma.

*Vegera Beytlehemê*

6 Wê gavê pirek bona ku ji axên
Moabê vegere, tevî bûkên xwe
rabû; ji ber xebera ku XUDAN
gîhaştiye alîkariya gelê xwe û nan
daye wan, li welatê Moabê bihîs-
tibû. 7 Bi wan re, ji cîhê ku lê bû
veqetiya û bona ku vegere welatê
Cihûda, ket rê.
8 Û Naomi ji her du bûkên xwe
re got: Vegerin malên diyên xwe!
Ger we çawa bi miriyên me û ji
min re qenciyê kiribin, bila XU-
DAN jî qenciyê ji we re bike!
9 Bila XUDAN, bona we her yekê
mêrek ku hûn li mala wî rehet bikin
bide! Dawiyê wan ramûsandin.
Her du bûk, bi qîr û qîr giriyê:
10 Na, em ê jî bi te re, vegerin cem
gelê te! gotin.
11 Naomî got: Vegerin qîzên min!
Ma çima hûn ê bi min re werin?
Ma êdî bona ku ji we re bibin mêr[1],
zarokên min dê bibin? 12 Vegerin
qîzên min, di rêya xwe de herin.
Qasî ku ez neçim mêr[2] pîr bûme.
Ger bibêjim hêviya min heye, ez
îşev bizewicim û lawan bînim dinê,
13 ma hûn heta ku ew mezin bibin,
dikarin bisekinin, we yê dev ji ze-
wacê berdana? Na qîzên min! Êşa
min ji ya we mezintir e. Ji ber ku
destê XUDAN, li dijî min rabû.
14 Û wan dîsa dest bi qîr û qîr gi-
riyê kirin. Dawiyê Orpa xwesiya
xwe ramûsand û xatir jê xwest. Lê
belê Rût wê hembêz kir[3].
15 Û wê ji Rût re got: Binêre, jin-
tiya te vegeriya gelê xwe û îlahê
xwe. Tu jî li pêy jintiya xwe here!
16 Lê belê Rût bi vî awayî bersivê
da: Ji min nexwaze ku ez te berdim
û vegerim! Ji ber ku tu biçî ku,
ez ê jî herim wir, tu li ku bimînî,
ez ê jî li wir bimînim. Dê gelê te
bibe gelê min û Xwedayê te bibe
Xwedayê min! 17 Tu li ku bimirî,
ez ê jî li wir bimirim û li wir bêm
binerd kirin. Ger ez xeynî mirinê,
bi sedemek din ji te biqetim, bila
XUDAN, ya hîn jî xerabtir bi min
bike! 18 Û gava wê dît ku, Rût bi
biryarî qirar daye ku dê pê re biçe,
ew zêde bi ser de neçû.
19 Û bi vî awayî her du jî, heta
Beytlehemê rêya xwe doman-
din. Û wusa bû ku, gava ew ketin
Beytlehemê, bona wan hemûya
bajêr rabûn ser pêlan. Pîrekan, bi
gotina: Ma Naomî ev e? ji hev re
pirsîn. 20 Û Naomî ji wan re got:
Ne bi navê Naomî[4], bi navê Mara
bangî min bikin. Ji ber Xwedayê

---

1 Li gor Tewratê, bona ku nîjada kesê mirî bidome, birayê wî an jî merivê wî, yê ku herî nêzîk e, bi jinabiya wî re dizewicîn.
2 Qasî ku ez nekarim bizewicim, an jî: Qasî ku ez nezewicim.
3 Li cem wê ma.
4 Naomî tê mana: Şêrîn, Mara jî tê: mana:Tahl.

ku hêza wî besî her tiştî ye[1], gellek
êş da min. 21 Gava ez çûm, her
tiştên min hebûn, lê belê XUDAN
min dest vala vegerand. Ma çima
hûn ê bi gotina Naomî bangî min
bikin ku? Hûn dibînin, XUDAN
min xist tengasiyê û Xwedayê ku
hêza wî besî her tiştî ye, bêtariyan
anî serê min.
22 A vay, Naomî tevî bûka xwe
Rûta Moabî ûsa ji axên Moabê
ve vegeriya. Ji Beytlehemê hati-
na wan, rastî dema çinandina ceh
hatibû.

*Rastîhatina Rût û Boaz*

2 Bi navê Boaz, merivek Naomî
hebû. Boazê ku ji nîjada mêrê
wî Elîmelek bû, zilamek pêş ve tê
û dewlemend bû. 2 Rojekê Rûta
Moabî, ji Naomî re ûsa got: Des-
tûrê bide ku ez herim zeviyan, li
pêy zilamek qencîperest similan
biçinim[2]. Naomî, bi gotina: Here
qîza min, bersivê da wê. 3 Bi vî
awayî ew[3] çû û li zeviyan, li pêy
oraqvanan dest bi berhevkirina
similan kir. Di dawiya rasthati-
nekê de, xwe di zeviya Boazê ku
ji nîjada Elîmelek e de dît. 4 Û a
vay, di vê navberê de Boazê ku
ji Beytlehemê hatibû, bi gotina:
Bila XUDAN bi we re be! Bangî
oraqvanan kir. Û wan jî bi gotina:
Bila XUDAN te pîroz bike! ber-
sivê dan wî. 5 Û Boaz, ji zilamê
xwe yî li serê oraqvanan ve diseki-
ne, pirsa: Gelo ev keçika ya kî ye?
pirsî. 6 Zilamê ku li ser oraqvanan
ve disekinî vê bersivê da: Keçi-
ka ya Moabî, ya ku tevî Naomî ji
axên Moabê ve hatiye, vêya ye!
7 Hat cem min û got: Rica dikim,
destûrê bide ku ez similan biçi-
nim, li pêy oraqvanan herim û
bermayiyên di nava demedan de
bidim hev! Û hat ji sibehê, heta
niha xebitî sekinî, gellekî kêm di
bin çardaxê de rawestiya!
8 Li ser vêya, Boaz ji Rût re got:
Guhdarî dikî, qîza min? Bona
bide hevina similan, neçe zevi-
yekî din; ji vir cuda nebe. Li vir,
tevî qîzikên minî xizmetkar bimî-
ne. 9 Bila çavê te li zeviya ku
oraqvan diçînin be, li pêy qîzikan
ve here. Bona ku dest nedin te,
emir dam zilamên xwe. Gava tu tî
bûyî, lêxe, here ji kûzên ku bi ava
ji bîrê ve hatiye kişandin dagirtine
vexwe.
10 Û pîrek xwar bû û bi dev û rû
çû erdê. Ji wi re got: Ma çima di
çavê te de xêr dîtim; bi vê biya-
niya min tu nêzîkiyê rê min didî?
11 Û Boaz bi vî awayî bersivê da:
Tiştên ku piştî mirina mêrê te, te
bona xwesiya xwe kiriye, yek û

1 Xwedayê ku hêza wî têra her tiştî ye; di Îbranîtî de: Şaday.

2 An jî: Berhev bikim, bidim ber hev.

3 Rût.

yek ji min re hate gotin. Te dev ji
diya xwe, bavê xwe û welatê ku
tu lê bûyiye berda û tu ket nava
neteweyekî ku te ji berê de qet ne-
dinasî[1]. 12 Bila XUDAN bersiva
kirinên te bide û Xwedayê Îsraêl
XUDANê ku, tu bona xwe di bin
bazikên wî de bisitire hatiye cem
wî, bila te bi comerdî bi xelat bike!
13 Û pîrekê got: Efendiyê min,
bila ez di çavê te de xêrê bibînim!
Ez ne ji cariyên te yek im, lê te
bi gotinên xwe, min cariya xwe
teselî kir, te dilê min firikand.
14 Û gava wexta xwarinê hat,
Boaz ji wê re got: Nêzîkî vir bibe,
nan rahêje, di şîrê de dake û bi-
xwe! Û pîrek li cem oraqvanan ve
rûnişt û wî similê ku hatiye qemi-
randin da wê. Û pîrekê, paşî hinek
xwar, têr bû, hinekan jî ji ber zêde
kir. 15 Û gava ji bo similan bide
hev rabû, Boaz emrê: Bila di nava
demedan de jî similan bide hev,
destî wê nedin da zilamên xwe!
16 Û: Heta, bona wê ji demedan
ve similan cihê bikin, deynin erdê
ku bila bide hev. Qet bi wê re
nexeyidin!
17 Û bi vî awayî, pîrek heta êvarî li
zeviyê similan da hev. Gava similên
ku dabû hev, qasî efayekê cehê wê
çêbû. 18 Vêya bar kir û vegeriya
bajêr. Xwesiya wê berhevkirinên
wê dît, wê jî, wekî din similên ku li
zeviyê paşî têrbûna xwe dabû ali-
yekî jî derxist û da wê. 19 Û xwe-
siya wê, bi gotina: Te îro li ku derê
similan da hev; tu li ku xebitî? jê
pirsî. Yê ku ewqas nêzîkiyê nîşanî
te dayiye, bila bê pîroz kirin! Û wê
ji zilamê ku di zeviya wî de xebitî
bû qal kir û ji xwesiya xwe re got:
Navê zilamê ku îro ez di zeviya wî
de xebitîm, Boaz e! 20 Û Naomî
ji bûka xwe re got: Bila XUDANê
ku ji zindiyan û ji miriyan xêra xwe
naparêze, wî pîroz bike! Û Naomî
ji wê re got: Ew zilama ji merivên
me, yek ji merivên me yî nêzîk e[2].
21 Û Rûta Moabî got: Di ser de ji
min re got: Heta ku zilamên min
karê çinandinê biqedînin tu bi wan
re bimîne! 22 Û Naomî, ji bûka
xwe Rût re got: Qîza min, bi qîzên
wî re çûna te hîn jî qenctir e. Di ze-
viyek din de be, dibe ku xesarek bê
serê te! 23 Û bi vî awayî wê heta
dawiya çinandina ceh û genim ji
qîzên xizmetkarên Boaz ve neqe-
tiya; similan da hev û bi xwesiya
xwe re mayînê domand.

*Rût û Boaz*

M.Sil 31,10

3 Xwesiya wê, Naomî rojekê ji
wê re got: Qîza min, ma hew-
ce nake ku bona qenciya te, ez li

1 Nas nedikir, an jî: Nas nekiriye.
2 Bi Îbranîtî Goel. Li gor Tewratê, merivê nêzîk, yê ku hewcedar e ku endamên malbatê, yên motaj biparêze.

cîhekî ku tu lê rehet bikî bigerim?
2 Ma Boazê ku tu tevî xizmetkarên
wî mayî, ne merivê me ye? A vay,
niha vê êvarê ew dê li cîhê bên-
derê ceh bide bakirin. 3 Xwe bişo,
bêhnan di xwe de bide û kincên
xwe li xwe bike û here cîhê bên-
derê. Lê belê heta ku zilam xwa-
rin û vexwarinê biqedîne, tu li wir
bûna xwe eşkere neke! 4 Gava zi-
lam dirêj be û di xew de biçe, ka li
ku raketiye, hîn bibe; dawiyê here
rûpişta li ser lingên wî ye rake û li
wir rakeve[1]. Û çi hewce bike ku tu
bikî, dê ew ê ji te re bibêje. 5 Û wê
bi gotina: Hemû tiştên ku te gotine
ez ê bikim, bersivê da wê.
6 Û çû cîhê bênderê û li gor hemû
gotinên xwesiya xwe kir. 7 Û
Boaz xwar û vexwar, kêfa wî hate
cîh. Dawiyê bona rakeve, çû bin-
ya komika bênderê. Rût jî bi dizî-
ka nêzîk bû, rûpişta li ser lingên
wî rakir û raket. 8 Û di nîvê şevê
de wusa bû ku, zilam tirsiya û
gava li cîhê ku raketibû ziviri, a
vay, pîreka ku di binya lingên wî
de raketiye dît! 9 Û pirsa: Tu kî
yî? ji wê pirsî. Û pîrekê, bi go-
tina: Ez cariya te Rût im! bersivê
da. Bi kirasê xwe ve cariya xwe
binixumîne; ji ber ku tu merivê
me yî nêzîk î! got. 10 Û wî got:
Bila XUDAN te pîroz bike, qîza
min! Ev qenciya te ya dawîn, ji
ya pêşîn jî mezintir e. Ji ber ku,
dixwaze bila dewlemend be, an
jî bila xizan be, tu li pêy xortan
ve neçûyî. 11 Û niha metirse qîza
min; ez ê her tiştê ku tu bêjî, ji te
re bikim. Ji ber hemûya gelê bajêr,
dizanin ku tu pîrekek bi xawên î.
12 Û niha merivek nêzîkî yê we
bûna min, rast e. Lê belê yekî ji
min nêzîktir jî heye. 13 Vê şevê
li vir biborîne! Dema sibeh bû,
ger ew zilam, bona te wezîfa xwe
yî merivantiyê bike, zehf qenc e;
bila bike! Lê belê ger ew nexwa-
ze ku wezîfeya xwe yî merivanti-
yê bike, ez ê bo xatirê XUDANê
zindî vê wezîfa bigirim ser xwe!
Tu heta sibehê rakeve!
14 Û bi vî awayî ew heta sibehê, di
binya lingê Boaz de raket. Lê belê
berî ku dor, qasî mirov hev hilbijê-
re ronî bibe rabû. Ji ber ku Boaz:
Divê hatina pîrekek ya cîhê bên-
derê neyê zanîn! gotibû. 15 Û wî
got: Rûpişta xwe derxîne û veke!
Û pîrekê rûpişta xwe vekir; Boaz
şeş olçek ceh pîvand, li wê kir û
çû bajêr. 16 Û çaxa vegeriya cem
xwesiya xwe û wê pirsa: Çawa
derbas bû qîza min? ji wê pirsî. Û
wê, her tiştên ku zilam jê re kiri-
ye têgihand wê. 17 Û wê got: Wî
ev şeş olçek ceh da min, ji ber ku:
Dest vala venegere cem xwesiya
xwe! got. 18 Û pîrekê[1] got: Qîza

---

[1] Li gor kevneşopa Cihûdan ya kevin ev tevgera, tê mana xwestina zewacê.

min, heta ku tu hîn bibî, ka dê ev
kar bibe çi, li malê bimîne; ji ber
ku Boaz, heta ku îro vî karî neqe-
dîne, dê nikaribe rehet bike!

*Boaz bi Rût ve dizewice*

4 Û di vê navberê de, Boaz çû û
di deriyê bajêr[2] de rûnişt. Û a
vay, gava zilamê nêzîkê merivati-
yê, yê ku wî qal kiribû, ji wir der-
bas dibû; bi gotina: Hevalo, were
li vir rûne! bangî wî kir. Û zilam jî
çû û li cem Boaz ve rûnişt. 2 Û pişt
re Boaz, deh kesên ji pêşhatiyên
bajêr ve civandin. Ji wan re got:
Hûn jî werin rûnin. Wan zilaman
jî rûniştin. 3 Û wî ji zilamê ku ji
merivatiyên nêzîk e re ûsa got:
Naomî ya ku ji welatê Moabê ve-
geriya, zeviya Elîmelek difiroşe.
4 Ez jî li ber yên ku li vir rûniştine
û pêşhatiyên gelê xwe ve xwestim,
bona tu wê bistîne, vê rewşê ji te re
bibêjim. Ger tu dixwaze ku wezî-
feya merivatiyên nêzîkiyê bikî, de
bike. Lê belê ger tu nikaribe wezî-
feya merivantiyê bîne cîh, bêje
ku ez bizanibim. Ji ber ku kirina
vê wezîfê, pêşiyê bi te dikeve; li
pêy te jî ez têm! Û zilam, bi go-
tina: Wezîfeya merivantiya nêzîkî,
ez ê bikim! bersivê da. 5 Li ser
vêya Boaz got: Roja ku te zeviyê
ji Naomî ve stend, divê bona bi
mêrasa ku navê yê miriye[3] daniye
bidome, tu jinebiya wî Rûta Moa-
bî jî bigire. 6 Zilamê ku nêzîkê
merivatiyê ye got: Di vê rewşê
de ez nikarim wezîfeya merivan-
tiya nêzîkî bikim; ger ez bikim,
ez ê mêrasa xwe bavêjim xeterê[4].
Wezîfa merivantiya nêzîkiyê ya
ku dikeve ser min, tu hilgirê ser
xwe! Ji ber ku ez nikarim wezîfa
merivantiya nêzîkiyê bikim!
7 Û di berê de, li Îsraêlê bona
bicîhanîna wezîfa merivantiya
nêzîkiyê û tesdîq kirina danûsten-
dina milkan yek ji aliyan[5] çaroxa
xwe derdixist û dida yê din. Rêya
meşrû kirina danûstendinê ev bû.
8 Û bo vê sedemê, zilamê ku ji
merivatiya nêzîk e, bi gotina: Tu
bi xwe bistîne! Û çaroxa xwe der-
xist. 9 Û Boaz ji pêşvehatiyan û
hemûya gel re got: Hûn jî îro bûn
şahde ku, min hemûya milkên Elî-
melek, Kîlyon û Mahlon ji destê
Naomî ve stend. 10 Û ez jinebiya
Mahlon, Rûta Moabî jî ji xwe re
bi jinitî digirim. Ûsa ku, bila navê
Mahlon, tevî mêrasa ku hiştiye bi-
dome; navê wî ji nava birayên wî û
bajarê ku lê jiyaye winda nebe. Îro
hûn li vêya bûn şahid! 11 Û hemû
gel û pêşhatiyên li ber deriyê bajêr

1 Naomî.
2 Di wan deman de, deriyê bajêr, cîhê axaftin û çareserkirina pirsgirêkan bû.
3 Navê Mahlon.
4 Talûkê.
5 Yanê yên ku di dozê de ne.

bûn: Belê, em şahde ne! gotin. Bila
XUDAN, pîreka ku tê mala te, bike
mîna ew her du sitûnên geş yên
nîjada Îsraêl – Rahel û Lêa –. Tu
di nîjada Efratê de dewlemend, di
Beytlehemê de bi nav û deng bibî!
12 Û bila bi zarokên ku XUDAN ji
vê pîreka ciwan ve bide te, nîjada
te bibe mîna nîjada Pêrezê ku Ta-
mar ji Cihûda re anîbû dinê!

*Nîjada Dawid*

1.Dîr 2,3-15; Met 1,3-6

13 Û bi vî awayî Boaz, Rût bi jini-
tî ji xwe re girt û ew bû jina wî[1]. Û
ew ket cem wê û XUDAN ducanîtî
dayê û lawekî anî dinê. 14 Û wê
gavê pîrekan ji Naomî re got: Bila
pesnahî ji XUDANê ku îro te bêyî
merivên nêzîk nehiştiye re be! Û
bila nav û dengê wî li Îsraêlê ve
belav bibe! 15 Ew ê te vegerîne
jiyanê, te bi pîritiya te ve têr bike!
Ji ber ku bûka te yî ji te hez dike û
bona te ji heft lawî jî birûmettir e
wî anî dinê.
16 Û Naomî lawik rahişt, him-
bêz kir û pîritiyê ji wî re kir. 17 Û
pîrekên cîran nav lê kirin û gotin: Ji
Naomî re lawek bû! Û navê Obêd li
wî kirin. Ev bavê Îşay, yê ku bavê
Dawid e[2].
18 Û nîjada Pêrez ûsa ye: Pêrez
bavê Hesron e 19 û Hesron bavê
Ram e û Ram bavê Amînadab e
20 û Amînadab bavê Nahşon e û
Nahşon bavê Salmon e 21 û Sal-
mon bavê Boaz e û Boaz bavê
Obêd e 22 û Obêd bavê Îşay e û
Îşay jî bavê Dawid e.

---

wê re raket.

2 Yanê, Obêd bavê Îşay, Îşay jî bavê Dawid e.

# 1. SAMÛYÊL

*Pêşgotin*

Ev Pirtûk, navê xwe ji Peyxamber Samûyêl ê ku mijara birrên pêşiyê ne distîne. Bûyerên Îsraêlê yên ji Serweran derbasbûna dema qiralan ji xwe re dike mijare. Ev guhertina ku di rêvebiriya Îsarêlê de hatiye holê li dora sê kesî bi zêdetir dibore: Samûyêlê dawînê Serweran e û qiralê Îsraêlê yê pêşiyê Saûl û Silêman.

Mijara vê Pirtûka mîna Pirtûkên din yên Kitêba Pîroz ev e ku; dilsoziya Xwedê serfiraziyê tîne, dijberiya Xwedê jî têkçûnê tîne. Ev mijar, ji kahîn Elî re; di ayeta 2;30'an de hatiye daxuyanî kirin: "Ez ê ji yên ku hurmetê ji min re kirine re hurmetê bikim û yên ku min nizm dibînin, dê bên biçûk kirin."

Di Pirtûkê de dijrabûnên bi cudayî yên li dijî avabûna qiraletiyê tête qal kirin. Xudan bi xwe mîna qiralê Îsraêlê dihat zanîn. Çawa ku gel qiralekî xwestin, Xwedê dîsa jî bona wan qiralekî hilbijart. Lê belê rastî ev bû ku; qiral jî, gel jî di bin rêvebiriya Xwedê de dijiyan. (2;7-10) Mafê xizan û dewlemend, hemûya gel, li gor Zagona Xwedê bi wekhevî dihatin parastin.
Pirtûkên 1. û 2. Samûyêl; dî Septuagînta de bi navê 1. û 2. Qiralan têtê zanîn.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-7:17 | Mîna Serwerekî Samûyêl |
| 8:1-10:27 | Qiralbûyîna Saûl |
| 11:1-15:35 | Salên pêşîn yên qiral Saûl |
| 16:1-30:31 | Dawid û Saûl |
| 31:1-13 | Mirina Saûl û lawên wî |

*Bûyîna Samûyêl*

1 Û ji çiyayiya Efrayîmê, ji Ramataîm-Tsofîmê zilamek hebû
û navê wî Elkana bû, lawê Yerohamê, lawê Elîhûyê lawê Tohûyê lawê Tsûf bû û ji Efraîmê bû.

2 Û du jinên wî hebûn: Navê yekê
Hanna û navê ya din Penînna bû
û zarokên Penînna hebûn, lê belê
zarokên Hanna tune bûn. 3 Û
ev zilama, bona ku ji XUDANê
artêşan re secde bike û qurban ser-
jê bike, ji salê heta salê, ji bajêr ve
hildikişiya Şîloyê. Û her du lawên
Elî Hofnî û Pînehas, kahînên XU-
DAN, li wir bûn. 4 Û dema roja
ku Elkana qurban serjê bike, parê
dida pîreka xwe Penînna û hemû
law û qîzên wê; 5 lê belê du par
dida Hanna; ji ber ku ji Hanna hez
dikir, lê belê XUDAN rehma wê
girtibû. 6 Û şirîka wê bona ku wê
hêrs bike, tahdê lê dikir, ji ber ku
XUDAN rehma wê girtibû. 7 Û
dema zilam ji salê heta salê wusa
dikir, her ku ji mala XUDAN der-
diket, pîrekê bi vî awayî tahdê
lê dikir; ew jî digiriya û xwarinê
nedixwar. 8 Û mêrê wê Elkana jê
re got: Hanna, ma tu çima digirî?
Û ma çima tu xwarinê naxwî? Û
çima dilê te bi keser e? Ma ez bona
te ji deh lawî ne qenctir im?
9 Û paşî li Şîloyê xwar û vexwar
Hanna rabû. Û Kahîn Elî li ber der-
zana deriyê Perestgeha XUDAN,
li ser kursiyê rûniştîbû. 10 Û pîrek
bi êşa dil ji XUDAN re dua dikir û
zehf digiriya. 11 Û qewlek danî û
got: Ya XUDANê artêşan! Ger bi
rastî tu li zebûniya cariya xwe binê-
re û min di bîra xwe de bîne û ger tu
cariya xwe ji bîr neke û lawekî bide
cariya xwe, ez ê di tûmiya rojên ji-
yana xwe de wî bidim XUDAN û
dê guzan li serê wî ve nekeve.
12 Û wusa bû ku, dema pîrek li ber
XUDAN duaya xwe dirêj dikir, Elî
li devê wê ve dinihêrt. 13 Lê belê
Hanna di dilê xwe de digot; lê belê
lêvên wê kil dibûn, lê dengê wê
nedihat bihîstin û Elî got qey ew
serxweş e. 14 Û Elî jê re got: Ma
tuyê heta kengê serxweşiyê bikî?
Xemrê ji ser xwe ve bavêje! 15 Û
Hanna bersivê da û got: Na efendi-
yê min, ez pîrekek ruhê wê bi keser
im; xemr û vexwarinê venexwarim,
lê li ber XUDAN dilê xwe der ki-
rim! 16 Tu cariya xwe pîrekek xe-
rab nehesibîne, ji ber ku, heta niha
ji ber zêdeyiya xem û keserê xwe
gotim. 17 Û Elî bersivê da û got:
Bi selametiyê here û bila Xwedayê
Îsraêl, tiştê ku te jê xwestiye bide
te! 18 Û jinikê got: Bila di çavên te
de cariya te xêrê bibîne. Û jinikê bi
rêya xwe ve çû û xwarinê xwar; êdî
wecê wê ne bi keser bû.
19 Û sibehê zû rabûn û li ber XU-
DAN secde kirin û vegeriyan Ra-
mayê û hatin mala xwe. Û Elkana
bi pîreka xwe Hanna ve yek bû û
XUDAN wê di bîra xwe de anî 20 û
wusa bû ku dema roj qediyan Han-
na ducanî bû û lawekî anî dinê û bi
gotina: Ji ber ku wî ji XUDAN ve
xwestim, navê Samûyêl lê kir.
21 Û zilamê wê Elkana, bona qur-
ban û borandeka xwe yî salan e

pêşkêşî XUDAN bike, tevî hemû
maliyan derket. 22 Lê belê Hanna
derneket; ji ber ku ji zilamê xwe
re got: Berî ku lawik ji şîr ve qut
nebe, ez dernakevim û bona ku li
ber XUDAN bête dîtin, ez ê wî, wê
demê bibim û dê ew her tim li wir
bimîne. 23 Û zilamê wê Elkana jê
re got: Yê ku di çavê te de qenc e
bike; heta ku tu wî ji şîr ve bibire
rûnê; lê belê bila XUDAN gotina
xwe pêdandî bike. Û pîrek ma û
heta ku lawê xwe ji şîr ve birrî, wî
da mêtandinê. 24 Û gava ji şîr ve
birrî, ganêrekî sê salî û efayek[1] ar-
van û hebanek xemrê rahişt û lawik
tevî xwe bir û wî li Şîloyê bir mala
XUDAN û lawik biçûk bû. 25 Û
gayê serjê kirin û lawik birin cem
Elî. 26 Û pîrekê got: Ax efendiyê
min, bo heqê jiyana te, efendiyê
min! ew pîreka ku li vir li cem te
sekinîbû û ji XUDAN re dua dikir,
ez im. 27 Bona vî lawikî dua ki-
rim û xwesteka ku ji XUDAN ve
xwestibûm da min; 28 min jî wî bi
diyarî da XUDAN; di tûmiya rojên
ku dê bijî de ji Xwedê re hatiye bi
diyarî kirin. Û li wir ji XUDAN re
secde kir.

*Duaya Hannayê*
Lûq 1,46-55

**2** Û Hanna dua kir û got:
Dilê min di XUDAN de bi
kêfxweşiyê dicoşe, hêza min di
XUDAN de bilind bû, li dijî neya-
rên min devê min vebû; ji ber ku ez
bi xelaskirina te kêfxweş dibim.
2 Tu kes mîna XUDAN ne pîroz
e; ji ber ku xeynî te nîne û mîna
Xwedayê me zinar nîne.
3 Êdî mezin mezin nebêjin; bila
kancî ji devê we ve dernekeve;
ji ber ku XUDAN, Xwedayê
zanînê ye û kar ji aliyê wî ve tên
wezinandin.
4 Kevanên egîdan hatin şikestin
û yên ku lingên wan tilpekî bûne,
hêzê li xwe kirin.
5 Yên têr, bona nan bûn karkerên
rojane û yên birçî gîhaştin reheti-
yê; heta pîreka stewr jî heft zarok
anî dinê; lê pîreka ku lawên wê
zêde ne, sist dibe.
6 XUDAN dukuje û divejîne; da-
dixe warê miriyan û hildikişîne.
7 XUDAN xizan dike û dewle-
mend dike; him nizm dike, him
bilind dike.
8 Bona ku tevî mîran bide rûniştin,
bona kursiya mezintiyê bide mêras
kirin, yê feqîr ji axê ve radike, yê
xizan ji nav sergo ve bilind dike; ji
ber ku sitûnên erdê yên XUDAN
in û dinê li ser wan ava kir.
9 Dê gavên bawerkirên xwe biparê-
ze; lê belê yên xerab, dê di tariyê de
bên bêdeng kirin; ji ber ku mirov
nikare li dijî hêzê serkeftî be.
10 Dê yên ku bi XUDAN re ke-
tine keftûleftê bên perçe perçe

[1] Li rasteka menan binêrin.

kirin; dê li ser wan ve ezman bi-
gurme; dê XUDAN serweriyê li
nîçikên dinê ve bike û hêzê bide
qiralê xwe û dê hêza Mesîhê[1] xwe
bilind bike.
11 Û Elkana çû Ramayê, mala
xwe. Û lawik li ber kahîn Elî xiz-
metê ji XUDAN re dikir.

*Xerabiya ku Lawên Elî kirine*

Hoş 4,6-10

12 Û lawên Elî, zilamên bêrêz
bûn; XUDAN nas nedikirin.
13 Û adeta kahînan ya bi netewê
re wusa bû: Dema mirovekî qur-
banê pêşkêş bike, gava goşt bike-
le, xizmetkarê kahîn, di destê wî
de çetelekî sê diranî dihat 14 û di
leganê de an jî lengerê de an jî di
qazanê de dadikir; her tiştê ku çe-
tel derdixist, kahîn bi wê radihişt.
Ji hemû Îsraêliyên ku dihatin wir,
li Şîloyê wusa dikirin. 15 Berî ku
bezê hundirê bişewitînin jî xizmet-
karê kahîn dihat û ji zilamê ku qur-
banê pêşkêş dike re digot: Goştên
qelandinê[2] bide kahîn! ji ber ku
dê ji te ne goştê kelandî, tenê yê
xavî rahêle. 16 Û ger zilam jê re:
Pêşiyê muheqeq dê bezê hundirîn
bişewitînin û wê gavê qasî ku canê
te dixwaze rahêle! bigota, wê gavê
jê re digot: Na, niha tuyê bi min
de û ger tu nede ez ê bi zorê bistî-
nim! 17 Û li ber XUDAN, sûcên
xortan zehf mezin bûn; ji ber ku
van zilamana pêşkêşiyên XUDAN
biçûk didîtin.
18 Lê belê Samûyêlê zarok, efo-
da kitanî li xwe kiribû û li ber
XUDAN xizmetê dikir. 19 Û
dayika wî, jê re cubbeyek biçûk
çê dikir û gava tevî zilamê xwe,
bona ku qurbana salê pêşkêş bike
hildikişiya, her sal ji wî re dianî.
20 Û Elî, Elkana û pîreka wî pîroz
kir û got: Bila di dêvla xelata ku
daye XUDAN de, XUDAN ji vê
pîreka nîjadê bide te. Û çûn cîhên
xwe. 21 Û XUDAN çû dîtina
Hanna û ducanî bû û sê lawik û
du qîzik anîn dinê. Û Samûyêlê
zarok li ber XUDAN mezin bû.
22 Û Elî zehf pîr bû û heçiyên ku
lawên wî bi Îsraêl ve dikirin û rake-
tina wanî bi pîrekên ku li ber deriyê
Çadira Civandinê xizmetê dikirin re
bihîstin. 23 Û ji wan re got: Ma çima
hûn tiştên wusa dikin? Ji ber ku ez ji
hemûya netewê xerabiyên we dibihî-
zim. 24 Na, lawên min, ji ber aga-
hiya ku bihîstime ne qenc e; hûn bi
qewma XUDAN re sûcê didin kirin.
25 Ger zilam li hember zilêm sûcê
bike, dê Xwedê daraziya wê bike;
lê belê ger zilamek li hember XU-
DAN sûcê bike, ma dê kî bona wî
lava bike? Lê belê gotina bavên xwe
guhdarî nekirin, ji ber ku XUDAN,
di ramana kuştina wan de bû. 26 Û

[1] Yê ku hatiye mesh kirin.

[2] Bijartinê, bistê, sorkirinê, an jî: Qijilandinê.

Samûyêlê zarok her ku diçe mezin dibû û ji XUDAN re jî û ji mirovan re jî meqbûl dibû.

*Gotina Peyxambertiyê ya li dijî Lawên Elî*

27 Û zilamekî Xwedê hate cem Elî û jê re got: XUDAN wusa dibêje: Ma gava li Misirê ji mala Fîrawûn re qûlitiyê dikirin, min xwe nîşanî mala bavê te neda? 28 Û bona ku derkeve pêşkêşîgeha min, buxurê vêxe û li ber min efodê li xwe bike, min ji nav hemûyên nîjadên Îsraêl, bona kahîntiyê wî ji xwe re bijartiye û hemû pêşkêşiyên lawên Îsraêlên ku bi agir ve tên kirin dame mala bavê te. 29 Ma çima hûn qurban û pêşkêşiya min ya ku li şunwarê pêşkêş kirime şunda vedigerînin û bona ku bi hemû qurbanên herî qenc ya netewa minî Îsraêl xwe qelew bikin, çima tu ji min zêdetir hurmetê ji lawên xwe re dikî? 30 Bo vê yekê, XUDANê Îsraêl dibêje: Bi rastî, gotibûm ku dê li ber min mala te û mala bavê te dê bêdawî bimeşin; lê belê niha XUDAN dibêje: Bila ev ji min dûr be! ji ber, ez ê ji yên ku hurmetê ji min re kirine re hurmetê bikim û yên ku min nizm dibînin[1], dê bên biçûk kirin. 31 A vay, bona ku li mala te zilamê kalepîr tune be, rojên ku ez ê bazûyê te û bazûyê mala bavê te jê bikim tên. 32 Di nava qenciya ku dê ji Îsraêl re bête kirin de, tuyê tengasiya mala xwe bibînî û dê êdî di mala te de zilamê kalepîr tune be. 33 Û zilamê te ê ku ez ê ji cem pêşkêşîgeha xwe navêjim, dê bona tefandina çavên te û keser dayîna canê te hebe û heçî zarokên maliyên te, dê di ciwaniyê de bimirin. 34 Û elameta ku dê ji te re bibe ev e; dê ew were serê her du lawên te Hofnî û Pînehas; dê her du jî di rojekê de bimirin. 35 Û ez ê bona xwe kahînekî dilsoz derxînim, dê ew li gor ya ku di dilê min de ye û di canê min de ye bike û ez ê bona wî xaniyekî zexm çêkim û dê di hemûya rojan de li ber Mesîhê min ve bimeşe. 36 Û dê wusa bibe ku, her zilamê ku ji ber mala te mayiye dê werin û bona pariyekî zîv û pariyekî nanê somî ji wî re xwar bibe û: Ez rica dikim, bona ku ez pariyekî nan bixwim, min bi karekî kahîntiyê wezîfedar bike! bibêje.

*Banga Xwedê ya ji Samûyêl re*

3 Û Samûyêlê zarok li ber Elî, xizmetê ji XUDAN re dikir. Û di wan rojan de kelama XUDAN kêm bû; bi zêdeyî xewn û xeyal nedibû. 2 Û wê gavê wusa bû ku, Elî li cîhê xwe raketî bû û çavên wî qels bûbûn êdî nedidît 3 û hîn qendîla XUDAN netefiyabû û dema di Perestgeha Xwedê de ya ku Sindoqa Xwedê li wir bû Samûyêl ra-

[1] Kêm, an jî: Bêrûmet dibînin.

ketî bû, 4 XUDAN bangî Samûyêl
kir û ew: A vay ez! got 5 û baz da
cem Elî û got: A vay ez, ji ber ku
te bangî min kir. Lê belê wî got:
Bangî te nekirim, here rakeve! Û
ew çû û raket. 6 Û dîsa XUDAN,
bi gotina: Samûyêl! dîsa bang kir.
Û Samûyêl rabû û çû ji Elî re got:
A vay ez, ji ber ku te bangî min kir.
Û wî got: Bangî te nekirim, lawê
min; here rakeve! 7 Û Samûyêl hîn
bi XUDAN ve nizanîbû û gotina
XUDAN hîn jê re nehatibû agahî
kirin. 8 Û XUDAN cara sêwemîn
dîsa bangî Samûyêl kir! Û rabû û
çû cem Elî û got: A vay ez, ji ber
ku te bangî min kir. Û Elî fêhm kir
ku XUDAN bangî lawik dike. 9
Li ser vêya Elî ji Samûyêl re got:
Here rakeve û dê wusa bibe ku,
ger bangî te bike, tuyê: Bêje ya
XUDAN, ji ber ku qûlê te guhdarî
dike! bibêje. Û Samûyêl çû cîhê
xwe û raket.
10 Û XUDAN hat, sekinî û mîna
carên berê bi gotina: Samûyêl,
Samûyêl! bang kir. Û Samûyêl got:
Bêje, ji ber ku qûlê te guhdarî dike!
11 Û XUDAN ji Samûyêl re got:
A vay, ez ê li Îsraêlê tiştekî bikim,
dê her du guhên heçiyên ku wê
bibihîzin biçingin. 12 Di derheqê
mala Elî de, her tiştên ku ji dest-
pêkê ve heta niha gotime, wê rojê,
ez ê bi wî bikim. 13 Ji ber, bona fe-
sadiya ku ew pê dizanî, têgîhandim
wî ku ez ê abadîn mala wî mehkûm
bikim, ji ber ku lawên wî naletê li
xwe anîn û nebû manihê wan. 14 Û
ji ber vêya, bi gotina; bona fesadi-
ya mala Elî dê abadîn bi qurban û
pêşkêşiyê neyê kefaret kirin; bona
mala Elî sondê xwarim!
15 Û Samûyêl heta sibehê raket
û bazikên deriyê mala XUDAN
vekir. Û Samûyêl tirsiya ku xewn
û xeyalê ji Elî re bibêje. 16 Û Elî
bangî Samûyêl kir û got: Lawê min
Samûyêl! Û ew: A vay, ez! got.
17 Û Elî got: Gotina ku XUDAN
ji te re gotiye, çî ye? Ez rica dikim,
ji min veneşêre; ger ji hemû tiştên
ku ji te re gotine, yekî jî tu ji min
veşêre, bila Xwedê ya ûsa û zêde-
tira wê ji te re bike! 18 Û Samûyêl
hemû tiştan têgîhand û jê veneşart.
Û Elî got: Ew XUDAN e; bila tiştê
ku di çavê xwe de qenc e bike.
19 Û Samûyêl mezin bû û XU-
DAN bi wî re bû û ji hemû gotinên
wî, yekî jî nexist erdê. 20 Û bi pey-
xambertiya XUDAN, wezîfedar
kirina Samûyêl, ji Danê heta Beer-
Şebayê hemûya Îsraêl pê zaniyan.
21 Û XUDAN dîsa li Şîloyê hate
xuyanî bûn; ji ber ku XUDAN
xwe li Şîloyê, ji Samûyêl re bi go-
tina XUDAN ve têgîhand.

*Sindoqa Peymanê bi dest ve tête xistin*

4 Û gotina Samûyêl gîhaşt hemû
Îsraêlê.
Û Îsraêl bona ku li dijî Filistiyan
cengê bike, derket û li cem Eben-

Ezerê artêşgehê danîn. Filistiyan jî
li Afekê artêşgehê ava kirin. 2 Û
Filistî li hember Îsraêliyan rêz bûn
û dema ceng bi her alî ve belav bû,
Îsraêl li ber Filistiyan hate lêxistin
û wan li beyarê, ji artêşê qasî çar
hezar kesî lêxistin. 3 Û netewe
hatin artêşgehê û kalepîrên Îsraêl
gotin: Çima îroj XUDAN li ber
Filistiyan li me xist? Em ji Şîloyê
Sindoqa Peymanê ya XUDAN bi-
girin cem xwe û bila were nav me
û me ji destên neyarên me ve xe-
las bike. 4 Û netewe zilam şandin
Şîloyê û Sindoqa Peymanê ya XU-
DANê artêşan ê ku li ser kerûbiyan
rûniştiye, ji wir anîn û her du lawên
Elî, Hofnî û Pînehas tevî Sindoqa
Peymanê ya Xwedê li wir bûn.
5 Û dema Sindoqa Peymanê ya
XUDAN ket artêşgehê, hemûya
Îsraêl bi qêrînek mezin qêriyan û
erd deng da. 6 Û Filistiyan dengê
qêrînê bihîstin û gotin: Ma ev
galegala li artêşgeha Îbraniyan çî
ye? Û pê fêhm kirin ku Sindoqa
XUDAN hatiye artêşgehê. 7 Û
Filistiyan tirsiyan, ji ber ku gotin:
Xwedê hat artêşgehê! Û gotin:
Wey li me! Ji ber ku berî vêya
tiştekî wusa nebûbû. 8 Wey li me!
Ma dê kî me ji destê van îlahên
xwurt xelas bike? Îlahên ku li çolê
bi her cûreyên asîwan li Misiriyan
xistine ev in. 9 Ya Filistiyan,
xwurt bin û mîna mêran bikin, ya
na, mîna ku Îbraniyan qûlitiyê ji
we re kirine, hûn ê qûlitiyê ji wan
re bikin; mîna mêran xwe radin
û cengê bikin! 10 Û Filistiyan
cengê kirin û Îsraêl hate lêxistin
û her kes reviya çadira xwe û
şikestînek zehf mezin çêbû; ji ber
ku ji Îsraêl sîh hezar peya ketin.
11 Û Sindoqa Xwedê hate
rahiştin û her du lawên Elî, Hofnî
û Pînehas mirin[1].

*Mirina Elî*

12 Û Benyamîniyek ji artêşê
ve baz da û di wê rojê de gîhaşt
Şîloyê û kincê wî çiriyabû û ax li
ser serê wî hebû. 13 Û gava hat, a
vay, Elî li ser kursiyê rûniştibû û li
qeraxa rê sekinîbû; ji ber ku, bona
Sindoqa Xwedê, dilê wî dilerizî. Û
gava zilam ket bajêr û agahdariyê
gîhand, hemûya bajêr qêriya. 14 Û
gava Elî qêrînê bihîst, got: Ma ev
galegal çî ye? Û zilam hema gîhaşt
û agahiyê da Elî. 15 Û Elî nod û
heyşt salî bû, çavên wî mat mayî
bûn û nedidît. 16 Û zilam ji Elî re
got: Ez, yê ku ji artêşê hatiye me û
îroj ez ji artêşê ve reviyam. Û got:
Ma çi bû lawê min? 17 Û zilamê
ku nûçeyê aniye bersivê da û got:
Îsraêl ji ber Filistiyan reviya û di
nava netewê de jî şikestinek mezin
çêbû û her du lawên te, Hofnî û
Pînehas jî mirin û Sindoqa Xwedê
jî hate stendin. 18 Û wusa bû ku,

1 Hatin kuştin.

dema zilam qala Sindoqa Xwedê
dikir, Elî ji kursiya xwe, berbi paşê
ve ket ber derî û stuyê wî şikest û
ew mir; ji ber ku kal bûbû û giran
bû. Û çel salî serweriyê li Îsraêlê
ve ajotibû.
19 Û bûka wî, pîreka Pînehas du-
canî bû û li ber welidînê bû û dema
agahiya stendina Sindoqa Xwedê
û mirina xezûr û mêrê xwe bihîst,
xwar bû û welidand; ji ber ku jana
wê pê girt[1]. 20 Û gava di ber mi-
rinê de bû, pîrekên ku li bala wê
bûn, jê re gotin: Metirse, ji ber ku
te lawekî anî dinê! Lê belê bersi-
vê neda û nexist dilê xwe. 21 Û ji
ber stendina Sindoqa Xwedê û ji
ber xezûr û mêrê xwe, bi gotina:
Mezintî ji Îsraêl çû! navê Îkabod[2]
da lawê xwe. 22 Û got: Mezintî ji
Îsraêl çû; ji ber ku Sindoqa Xwe-
dê jê hate stendin!

*Sindoqa Peymanê dikeve destê Filistiyan*

5 Û Filistiyan Sindoqa Xwedê bi
dest ve xistibûn û wê ji Eben-
Ezerê anîn Aşdodê. 2 Û Filistiyan
Sindoqa Xwedê rahiştin û birin
mala Dagon û wê danîn cem Da-
gon. 3 Û Aşdodiyan dotira rojê zû
rabûn û a vay, Dagon li ber Sin-
doqa XUDAN bi ser dev ve ke-
tibû erdê. Û Dagon rahiştin û dîsa
danîn cîhê wî yê berê. 4 Û dotira
rojê sibehê zû rabûn û a vay, Da-
gon li ber Sindoqa XUDAN bi ser
dev re ketibû erdê û her du dest û
seriyê Dagon hatibûn jê kirin û li
derzanê bûn; tenê gewda wî ji Da-
gon re mabû. 5 Ji ber vê yekê, heta
îrojê kahînên Dagon û hemûyên
ku têne mala Dagon, li Aşdodê,
pêlî derzana mala Dagon nakin.
6 Û destê XUDAN li ser Aşdodiyan
ve giran bû û wan helaq kir, bi
ûran li wan û Aşdodê û sînorên wê
xist. 7 Û dema Aşdodiyan dîtin ku
ûsa ye, gotin: Bila Sindoqa Xwe-
dayê Îsraêl li cem me nemîne; ji
ber ku destê wî li ser me û li ser
îlahê me Dagon ve dijwartir bû.
8 Û şandin û hemû begên Filisti-
yan li cem xwe civandin û gotin:
Ma em Sindoqa Xwedayê Îsraêl
çi bikin? Û wan gotin: Bila Sin-
doqa Xwedayê Îsraêl bibin Gatê.
Û Sindoqa Xwedayê Îsraêl birin
wir. 9 Û wusa bû ku, paşî wan ew
birin, destê XUDAN li hember ba-
jêr bû; şaşbûnek zehf mezin bû; li
gelê bajarên biçûk û mezin xistin
û di ser wan de ûr derketin. 10 Û
Sindoqa Xwedê şandin Ekronê. Û
wusa bû ku, dema Sindoqa Xwedê
hate Ekronê, Ekroniyan qêriyan û
wusa gotin: Bona me û netewa me
bikujin, Sindoqa Xwedayê Îsraêl

[1] An jî: Jan hat ser wê.
[2] Mezinahî nîne.
[3] An jî: Ji me re anîn!

anîn cem me[3]! 11 Û şandin û hemû
begên Filistiyan civandin û gotin:
Sindoqa Xwedayê Îsraêl bişînin,
bila dîsa vegere cîhê xwe û bila me
û netewa me nekuje! Ji ber ku di
hemûya bajêr de şaşbûniya mirinê
hebû; destê Xwedê li wê derê zehf
giran bû. 12 Zilamên ku nemirin jî
bi ûran ve hatin lêxistin û qêrîna
bajêr gîhaşt erş û ezmanan.

*Sindoqa Peymanê şunda didin Îsraêl*

6 Û Sindoqa XUDAN, heft meh
li welatê Filistiyan ma. 2 Û Fi-
listiyan bangî kahînan û nêrînva-
nan kirin û gotin: Ma em Sindoqa
XUDAN çi bikin? De ka ji me
re bibêjin, em ê wê çawa bişînin
cîhê wê. 3 Û wan gotin: Ger hûn
ê Sindoqa Xwedayê Îsraêl bişînin,
wê vala neşînin; lê belê muheqeq
pêşkêşiyekî gunehê jê re pêşkêş
bikin; hûn ê wê gavê aram bibin
û dê ji we re bête gîhandin ku ka
destê wî çima ji we venakêşe. 4 Û
gotin: Ma ka pêşkêşiya gunehê,
ya ku em ê pêşkêş bikin, dê çi be?
Û wan gotin: Divê li gor hejmara
begên Filistiyan, pênc ûrên zêr û
pênc mişkên zêr bibin; ji ber ku
asîwa li ser we hemûyan û ya ku
li ser begên we ye, yek e. 5 Ji ber
vêya, divê hûn sûretên ûrên xwe û
sûretên mişkên ku welatê we xera
dikin, çêbikin û mezintiyê bidin
Xwedayê Îsraêl; dibe ku ji ser we
û ji ser welatê we û ji ser îlahên
we destê xwe sivik bike. 6 Û ma
çima mîna ku Misirî û Fîrawûn
dilên xwe hişk kirin, hûn jî dilên
xwe hişk dikin? Ma paşî di nav
wan de karên ku şaş dike kirin,
wan netewê ber nedan? Û ew çûn.
7 Û niha erebeyek nû û du çêlekên
bi golik ên ku nîr li wan nehatiye
xistin amade bikin û çêlekan bi
erebê ve girê bidin û golikên wan
ji pêy wan biqetînin û bibin malê
8 û Sindoqa XUDAN rahêlin û
deynin ser erebê û tiştên zêr ên
ku, hûn ê bi pêşkêşîbûna gunehê
bidin, di nava sindoqekî biçûk de
deynin cem wê û wê berdin bila
here. 9 Û binêrin; ger ji rêya sînorê
xwe derkeve Beyt-Şemeşê, yê ku
vê xerabiya bi me dike XUDAN
e û ya na, em ê bizanibin, yê ku li
me dixe ne destê wî ye; ev tişt bi
rasthatiyê bûye.
10 Û zilaman wusa kirin û du
çêlekên hîn şîr didin mêtin rahiştin
û wan bi erebê ve girêdan û go-
likên wan di malê de girtin 11 Û
Sindoqa XUDAN bi qûtiya ku
sûretên mişkên zêrînî û yên ûran
tê de ne, pev re danîn ser erebê.
12 Û çêlekan, raste rast ji rêya
Beyt-Şemeşê ve çûn û bi çep û
rastê ve çewt nebûn û di rêgeha
mezin de bi mûremûrê ve çûn û
begên Filistiyan heta sînorê Beyt-
Şemeşê li pêy wan meşiyan. 13 Û
Beyt-Şemeşî di newalê de genim
diçinandin û çavên xwe hildan

û Sindoqê dîtin û ji ber tiştê ku
dîtibûn kêfxweş bûn. 14 Û ere-
be ket nav zeviya Yeşûyê Beyt-
Şemeşî û li wir sekinî; li wir ke-
virekî mezin hebû û êzingê erebê
qelişandin û çêlekan jî ji XUDAN
re bi pêşkêşiya şewitandinê ve
pêşkêş kirin. 15 Û Sindoqa XU-
DAN û Sindoqa biçûk ya li cem
wê, ya ku tiştên zêr yên biçûk
tê de ne, Lêwiyiyan daxistin û
danîn ser kevirekî mezin û ew
roj Beyt-Şemeşiyan pêşkêşiyên
şewitandinê pêşkêşî XUDAN ki-
rin û qurbanan serjê kirin. 16 Û
paşî ku şeş begên Filistiyan, vê
yekê dîtin, di wê rojê de vegeri-
yan Ekronê.
17 Û ûrên zêrîn, ên ku Filistiyan
bi pêşkêşiya gunehan pêşkêşî
XUDAN kirin: Bona Aşdodê yek,
bona Gazayê yek, bona Gatê yek,
bona Ekronê yek 18 û heta kevirê
ku Sindoqa XUDAN danîn ser, ê
ku li zeviya Yeşûyê Beyt-Şemeşî
ye û heta îrojê disekine, qasî
hejmara hemû bajarên Filistiyên
ku aidê pênc begê Filistiyan e, qasî
hejmara bajarên bi dîwar û gundên
wê yên beyarê mişkên zêrîn.
19 Xwedê ji zilamên Beyt-Şemeşê
jî xist, ji ber ku li hundirê Sin-
doqa XUDAN nihêrtibûn. Û di
netewê de li heftê kesî xist, pên-
cî hezar kes[1] û netewe şînê girt,
ji ber ku XUDAN bi lêxistinekî
mezin li netewê xist. 20 Û Beyt-
Şemeşiyan gotin: Ma kî dikare li
ber vî Xwedayê Pîroz, li ber XU-
DAN bisekine? Û ma bila ji me
derkeve cem kî? 21 Û şandiyan
ji gelên Kîryat-Yearîm re şandin
û gotin: Filistiyan Sindoqa XU-
DAN şunda vegerandin; dakevin,
wê hilkişînin cem xwe.

*Samûyêl Serweriyê li Îsraêlê dike*

7 Û gelên Kîryat-Yearîmê hatin
û Sindoqa XUDAN derxistin
û wê birin hundirê mala Abîna-
dabê ku xaniyê wî li ser girê yî
û bona ku li benda Sindoqa XU-
DAN be, lawê wî Eleazar pîroz
kirin. 2 Û wusa bû, paşî ku Sindo-
qê danîn Kîryat-Yearîmê, gellek
wext buhurî, heta bîst sal derbas
bû û hemûya mala Îsraêl bêriya
XUDAN kirin.
3 Û Samûyêl bi hemûya mala Îs-
raêl re axifî û ji wan re got: Ger
hûn bi hemûya dilê xwe ve vege-
riyabin XUDAN, îlahên biyan û
Astartiyan ji nav xwe bavêjin û
dilên xwe bizîvirînin XUDAN û
tenê ji wî re qûlitiyê bikin; dê ew jî
we ji destên Filistiyan xelas bike!
4 Wê gavê lawên Îsraêl Astartî û
Baalan ji nav xwe ve avêtin û tenê
ji XUDAN re qûlitiyê kirin.
5 Û Samûyêl got: Hemûya Îsraêl
li Mîtspayê bicivînin ku ez bona
we ji XUDAN re dua bikim. 6 Û

[1] An jî: Zilamên pêncî malbatê.

li Mîtspayê civiyan û avê kişandin
û li ber XUDAN rijandin û wê
rojê rojiyê girtin û li wir: Me li
dijî XUDAN sûcê kirin! gotin. Û
Samûyêl li Mîtspayê daraziyê ji
lawên Îsraêl re kir. 7 Û Filistiyan
bihîstin ku lawên Îsraêl li Mîtspa-
yê civiyane û begên Filistiyan li
hember lawên Îsraêl derketin.
Û lawên Îsraêl vêya bihîstin û ji
Filistiyan tirsiyan. 8 Û lawên Îs-
raêl ji Samûyêl re gotin: Bona ku
me ji destê Filistiyan xelas bike,
ji XUDAN Xwedayê me re bona
me hawar û qêrînê qet kêm meke!
9 Û Samûyêl berxikek şîr rahişt
û wê bi pêşkêşiya ku bitûmî tête
şewitandin pêşkêşî XUDAN kir
û Samûyêl bona Îsraêl ji XU-
DAN re qêriya û XUDAN ber-
sivê da wî. 10 Û dema Samûyêl
pêşkêşiya şewitandinê pêşkêş
dikir, Filistî, bona ku li hember
Îsraêliyan cengê bikin nêzîk hatin
û XUDAN, wê rojê bi dengekî
mezin li ser Filistiyan ve qêriya û
wan şaş kir û li ber Îsraêliyan ha-
tin lêxistin. 11 Û Îsraêlî ji Mîtspa-
yê derketin û bera Filistiyan dan û
heta ku gîhaştin binya Beyt-Karê
li wan xistin.
12 Û Samûyêl kevirekî rahişt û di
navbera Mîtspa û Şênê de çikand
û navê Eben-Ezerê[1] lê kir û got:
XUDAN heta vir alîkariyê bi me
re kir. 13 Û Filistiyan nizm bûn
û êdî, carekî din jî neketin hun-
dirê sînorê Îsraêl û di hemûya
rojên Samûyêl de destê XUDAN
li dijî Filistiyan bû. 14 Û bajarên
ku Filistiyan ji Ekronê heta Gatê,
ji Îsraêl ve stendibûn, ji Îsraêl re
şunda hatin dayîn; Îsraêl, sînorên
vana jî ji destê Filistiyan ve xelas
kirin û di nava Îsraêl û Amoriyan
de aştî hebû[2].
15 Û Samûyêl di hemûya rojên
jiyana xwe dę serweriyê ji Îsraêl
re kir. 16 Û sal bi salê bi dorê diçû
Beytelê û Gîlgalê û Mîtspayê di-
geriya û li hemûya van cîhan de
serweriyê li Îsraêl re dikir. 17 Û
vedigeriya Ramayê, ji ber ku mala
wî li wir bû; li wir jî serweriyê li Îs-
raêl re dikir û li wir pêşkêşîgehekê
ji XUDAN re çêkir.

*Gelê Îsraêlê Qiralekî dixwaze*

5.Mûs 17,14-20; Hoş 13,10-11

8 Û wusa bû ku, dema Samûyêl
kal bû, lawên xwe li ser Îs-
raêl ve bi serwerî danî. 2 Û navê
lawê wî yê mezin Yowêl û navê
yê duwemîn jî Abiya bû; li Beer-
Şebayê serwer bûn. 3 Û lawên wî,
di rêya wî de nemeşiyan û li pêy
qezenca xerab ve çûn û bertîlê
stendin û daraziya xerab dan.
4 Û hemû kalepîrên Îsraêl civiyan
û li Ramayê hatin cem Samûyêl

[1] Kevirê alîkariyê.

[2] Yanê li hev hatin hebû.

5 û jê re gotin: A vay, tu kalepîr bû û
lawên te, di rêya te de nameşin; niha
mîna hemû gelan, bona ku serweriyê
li me bike, qiralekî deyne serê me!
6 Lê belê dema: Bona ku serweriyê
li me bike, qiralekî deyne serê me!
gotin, ev gotin di çavê Samûyêl de
xerab hate xuyanîbûn. Û Samûyêl ji
XUDAN re dua kir. 7 Û XUDAN ji
Samûyêl re got: Di her tiştê ku ji te
re dibêjin de, gotina netewê guhdarî
bike, ji ber, yê ku naxwazin ne tu yî;
lê bona ku ez li ser wan qiraletiyê
nekim, min nexwestin. 8 Ji roja ku
wan ji Misirê ve derxistime heta îro-
jê, li gor karên ku ji îlahên din re bi
qûlitî kirinê, çêkirine, ji te re jî wusa
dikin. 9 Û niha gotina wan guh-
darî bike; lê tenê, tuyê bi eşkeretî
şahdeyiyê ji wan re bike û tuyê da-
raziya qiralê ku dê qiraletiyê ji wan
re bike ka çî ye bîgehîne wan.
10 Û Samûyêl, ji netewa ku qirale-
tiyê jê dixwazin re, hemû gotinên
XUDAN got. 11 Û got: Dê dara-
ziya qiralê ku li ser we qiraletiyê
bike ev be: Dê lawên we ji xwe re
rahêje û deyne ser erebeyên xwe yî
cengê û nava siwarên xwe û dê li
pêşiya erebeyên wî bazdin 12 û dê
wan ji xwe re bike serokê hezaran
û serokê pênciyan û dê hinekan jî,
bona cot kirinê û çinandina zad û
bona haletên cengê û çêkirina ere-
beyên wê, deyne. 13 Û bona ku
bike bêhnfiroş û aşvan û nanvan,
dê qîzên we rahêle. 14 Û zeviyên
we û rezên we û zeytûngehên we,
herî qencên wan dê rahêje û bide
qûlên xwe. 15 Û dê dehekên tov û
rezên we rahêle û bide karmendê
qesrê û qûlên xwe. 16 Û dê qûlên
we û cariyên we û xortên we yî
bijartî û kerên we rahêle û di karê
xwe de bixebitîne. 17 Dê dehekê
keriyên we rahêle û hûn ê bibin
qûlên wî. 18 Û ji ber qiralê we yê
ku hûn ê bona xwe hilbijêrin, hûn
ê wê rojê hawar û qêrînê bikin û dê
XUDAN wê rojê bersivê nede we.
19 Lê belê, netewe nexwest ku
gotinên Samûyêl guhdarî bikin û
gotin: Na; lê belê, dê li ser me qi-
ralek bibe 20 û em ê jî bibin mîna
hemû netewan û dê qiralê me ser-
weriyê li me bike û dê di pêşiya
me de derkeve û dê cengên me
bike. 21 Û Samûyêl hemû gotinên
netewê bihîst û wan ji XUDAN re
got. 22 Û XUDAN ji Samûyêl re
got: Gotina wan guhdarî bike û ji
wan re qiralekî çêke. Û Samûyêl
ji Îsraêliyan re got: Bila her kes
biçe bajarê xwe!

*Saûl bi Qiraletiyê tête wezîfedar kirin*

9 Û ji Benyamînê zilamek hebû,
lawê Afîahê, lawê Bekoratê,
lawê Tserorê, lawê Abîêl bû û navê
wî Kîş bû; lawê zilamekî Ben-
yamînî, yekî mêrxas û egîd bû[1].
2 Û lawekî wî yî xort û bedew

[1] Bixawên, birûmet, an jî: Rêzdar bû.

hebû û navê wî Saûl bû û di nava
lawê Îsraêl de zilamekî jê bedew-
tir tune bû; ji serpiyên wî wêdetir
qama hemûya netewê derbas dikir.
3 Û kerên Kîşê bavê Saûl winda
bûn. Û Kîş ji lawê xwe Saûl re
got: Xulamekî bigre cem xwe û
rabe here, li keran bigere! 4 Û ew
ji çiyayiya Efrayîm ve derbas bû
û ji welatê Şalîşa ve derbas bû, lê
belê wan nedîtin û ji welatê Şaalîm
ve derbas bûn, ne li wir jî bûn û ji
welatê Benyamîniyan ve derbas
bûn û wan nedîtin.
5 Û hatin welatê Tsûfê û Saûl ji
xulamê xwe yê ku li cem e re got:
Were em vegerin, ya na dê bavê
min dev ji keran berde û bo me
xemê bikişîne. 6 Û wî jê re got: A
vay, li vî bajarî zilamekî Xwedê
heye, ew zilamekî birêz e û her çi
bibêje, muheqeq dê bibe; niha em
herin wir; dibe ku rêya em ê pê de
biçin ji me re bibêje. 7 Û Saûl ji
xulamê xwe re got: Û a vay, ma
gava em biçin em ê çi ji zilam re
bibin? Ji ber ku di qabên me de nan
qediya û diyariyekî ku em ji zilamê
Xwedê re bibin nîne; ma çiyî me
heye? 8 Û xulam dîsa bersivê da
Saûl û got: A vay, di destê min de
çarîkek şekelê[1] zîvînî heye; ez ê
wê bidim zilamê Xwedê û dê rêya
me bighîne me. 9 – Yên berê, gava
bona di Îsraêl de ji Xwedê ve bi-
pirse diçû, wusa digot: Were, em
herin cem yê ku Dîtiye. Ji ber, ji yê
ku jê re niha peyxamber tê gotin,
pêşiyê yê Dîtiye dihat gotin. – 10
Û Saûl ji xulamê xwe re got: Te
qenc got; were em herin! Û çûn
bajarê ku zilamê Xwedê lê ye.
11 Û gava ji kaşê ve hildikişiyan,
pîrekên ciwan ên ku bona
kişandina avê hildikişin dîtin û
ji wan re gotin: Ma yê ku Dibîne
li vê derê ye? 12 Û bersivê dan
wan û gotin: Li vê derê ye; a vay,
li ber te ye, niha lez bike, ji ber
ku îro hate bajêr; ji ber ku îro li
cîhê bilind qurbana netewê heye.
13 Dema hûn bikevin bajêr, berî
ku ew derkeve cîhê bilind, hema
hûn ê wî bibînin; ji ber, berî ku ew
neyê, netewe xwarinê naxwe, ji
ber ku ew qurbanê pîroz dike; yên
ku hatine dawet kirin, paşî hatina
wî xwarinê dixwin. Û niha derke-
vin; ji ber ku hûn ê di vê wextî de
wî bibînin. 14 Û hilkişiyan bajêr;
gava gîhaştin hundirê bajêr, a vay,
Samûyêl bona ku derkeve cîhê bi-
lind, ber bi wan hildikişiya.
15 Û rojekê berî hatina Saûl, XU-
DAN ji Samûyêl re vekirîbû û go-
tibû: 16 Sibê, di van wextan de, ez
ê ji welatê Benyamîn ve zilamekî
ji te re bişînim û tuyê wî li ser ne-
tewa min Îsraêl, bona ku bibe se-
rok mesh bike û dê ew netewa min
ji destê Filistiyan xelas bike; ji ber
ku li rewşa netewa xwe nihêrtim;

1 Li rasteka menan binêrin.

ji ber ku qêrîna wan gîhaşt min.
17 Û gava Samûyêl Saûl dît, XU-
DAN jê re got: A vay, zilamê ku ji
te re gotime! Dê ev li ser netewa
min serweriyê bajo. 18 Û Saûl li
ber derî nêzîkî Samûyêl bû û got:
Ez rica dikim, mala yê ku Dibîne
li ku derê ye, ji min re bibêje. 19 Û
Samûyêl bersivê da Saûl û got: Yê
ku Dibîne ez im; ji pêşiya min ve
derkevin cîhê bilind; ji ber ku hûn
ê îro tevî min bixwin û sibehê ez
ê te bişînim û her tiştên ku di dilê
te de yî, ez ê bighînim te. 20 Û
gava em bên qala kerên te yên ku
sê roj berê winda bûne, xema wan
nekişîne, ji ber ku hatin dîtin. Û
hemû xwesteka Îsraêl, ma bona kî
ye? Ma ne bona hemûya mala te û
ya bavê te ye? 21 Û Saûl bersivê
da û got: Ma ez ne ji Benyamîna
herî biçûkê nîjada Îsraêlê me? Û
eşîra min ne herî biçûka nîjada
Benyamîn e? Ma çima tu tiştekî
wusa ji min re dibêje?
22 Û Samûyêl, Saûl û xulamê wî
girt û wan birin odeka mêvanan û
li pêşiya vexwendiyan ên ku qasî
sîh zilamî bûn, cîh da wan. 23
Û Samûyêl ji aşvan re got: Para
ku bi gotina: Li cem xwe bigire,
dabûm te bîne. 24 Û aşvan hêt û
ya ku li ser wê ye anî û danî ber
Saûl. Û Samûyêl got: A vay, yê
ku dest lê hatiye danîn bigire ber
xwe û bixwe; ji ber ku heta wex-
ta bijartî a ku bangî netewê kirim
gotim, bona te hate hilanîn! Û ew
roj Saûl, tevî Samûyêl xwar.
25 Û ji cîhê bilind ve daketin ba-
jêr û li ser xanî bi Saûl re axifî.
26 Û zû rabûn û wusa bû ku, dema
berbang avêt Samûyêl ji ser xanî
ve bangî Saûl kir û got: Rabe ku
ez te bişînim! Û Saûl rabû, ew û
Samûyêl, her du jî derketin derve.
27 Û gava ew ji qeraxa bajêr ve
dadiketin Samûyêl ji Saûl re got:
Ji xulam re bibêje ku bila derbasî
pêşiya me bibe û ew derbas bû.
Lê niha tu bisekine ku ez gotina
Xwedê ji te re bibêjim!

10 Û Samûyêl şûşa rûn rahişt û
bi ser serê wî ve rijand û wî
ramûsand û got: XUDAN, li ser
mêrasa xwe bi serokantiyê te mesh
kir, ne wusa ye? 2 Îro, paşî ku tu ji
cem min here, li sînora Benyamîn,
li Tseltahê, li ber gora Rahêl, tuyê
du zilamî bibîne û dê ew ji te re
bibêjin: Kerên ku tu bona li wan
bigere çûye, hatin dîtin û a vay,
bavê te dev ji karê keran berda û
bi gotina: Ez bona lawê xwe çi
bikim? kete xema we. 3 Û tuyê
ji wir pêş ve here û bighêje kele-
miya Taborê û sê zilam hildikişin
Beytelê, ên ku yek ji wan, sê ka-
rik, yek sê nanê somî, yekê din jî
hebanek xemrê dikişînin ji Xwedê
re dê li wir te bibînin 4 û dê ji te
re hal û xatirê te bipirsin û dê du
nanî bidin te, tuyê jî ji destên wan

rahêle. 5 Paşê tuyê bigihêje girê
Xwedê[1] ya ku leşkerên Filistî lê
ne û dê wusa bibe ku, dema tu ket
wir, bajêr, tuyê rastî civatekî pey-
xamberan, ên ku li ber wan santûr
û tef û zurne û çenk hene û ji cîhê
bilind ve dadikevin, bê û dê ew di
kirina peyxambertiyê de bin 6 û
dê Ruhê XUDAN bi hêz were ser
te û tuyê bi wan re peyxambertiyê
bike û buguhere û bibe zilamekî
din. 7 Û bila wusa bibe ku, dema
ev nîşan ji te re bibe, bona xwe çi
ji destê te bê, bike, ji ber ku Xwe-
dê bi te re ye. 8 Û tuyê di pêşiya
min de dakeve Gîlgalê û a vay, ez
ê bona pêşkêşîkirina pêşkêşiyên
şewitandinê û bona serjêkirina
qurbanên selametê dakevim cem
te; heta ku ez werim cem te û ka
tuyê çi bikî bigihînim te, tuyê heft
rojî bisekine.
9 Û wusa bû ku, dema ji cem
Samûyêl, bona ku bi rê bikeve
pişta xwe zivirand, XUDAN di-
lekî din da wî û ew roj, hemûya
van nîşanan bûn. 10 Û gava hate
wir, Gîbeayê, a vay, civatek pey-
xamberan pêrgîniya wî kirin û
Ruhê Xwedê bi hêz hate ser wî û
di nava wan de peyxambertiyê kir.
11 Û wusa bû ku, hemûyên ku ji
berê ve wî nas dikirin, a vay, dîtin
ku bi peyxamberan re peyxamber-
tiyê dike, wê gavê netewe ji hev û
din re gotin: Ev tiştê ku ji lawê Kîş
re bûyiye çî ye? Ma Saûl jî di nava
peyxamberan de ye? 12 Û zilamek
ji wê derê yî, bersivê da û got: Ba-
vên wan kî ye? Ji ber vêya ye ku,
gotina ma Saûl jî di nava peyxam-
beran de ye? bû methelok.
13 Û gava peyxambertiyê qedand,
hate cîhekî bilind.
14 Û apê Saûl, ji wî û xulamê wî
re got: Ma hûn çûn ku derê? Û
wî got: Em çûn li keran bigerin
û gava me wan nedîtin, em ha-
tin cem Samûyêl. 15 Û apê Saûl
got: Ez ji te rica dikim, Samûyêl
ji te re çi gotibe, ji min re bibêje.
16 Û Saûl ji apê xwe re got: Dîti-
na keran, bi eşkeretî ji me re got.
Lê belê gotina qiraletiyê, ya ku
Samûyêl gotibû jê re negot.
17 Û Samûyêl, netewê li Mîtspayê,
ji XUDAN re civand 18 û ji lawên
Îsraêl re got: Xwedayê Îsraêl XU-
DAN, wusa dibêje: Min Îsraêl ji
Misirê ve derxist û ji destê Misi-
riyan û ji destê hemû qiraletiyên
ku tengasiyê didin we, we azad
kirin; 19 lê belê we, ew Xwedayê
xwe, yê ku ji hemû asîwên we û
tengasiyên we, we xelas kirine,
îroj nexwestin[2] û jê re: Na, lê belê
qiralekî deyne serê me! gotin. Û
niha, li gor nîjadên we û li gor he-
zarên we li ber XUDAN bisekinin!
20 Û Samûyêl hemû nîjadên Îs-

1 Bi Îbranîtî Gîbea-Elohîm.

2 Red kirin. Red kirin.

raêl nêzîkî hev kirin û nîjada Ben-
yamîn ve hate girtin. 21 Û nîjada
Benyamîn, li gor eşîrên wê nêzîk
kirin û Eşîra Matriyan hate girtin
û Saûlê lawê kîş hate girtin û gava
lê geriyan, nehat dîtin. 22 Û dîsa ji
XUDAN ve pirsiyan: Ma kesî ku
hîn dê bête vir heye? Û XUDAN
got: A vay, wî di nav pertalan[1] de
xwe veşart. 23 Û baz dan û wî ji
wir ve rahiştin û gava di nava nete-
wê de disekinî, ji sermilên wî wê-
detir, qama hemûya netewê derbas
dikir. 24 Û Samûyêl ji hemûya
netewê re got: Ma we zilamê ku
di nava hemûya netewê de mînakê
wî nîne û yê ku XUDAN bijartiye
dîtin? Û hemûya netewê qêriyan
û: Bijî qiral! gotin.
25 Û Samûyêl ûsila qiraletiyê
ji netewê re got û li pirtûkê ni-
vîsand û danî ber XUDAN. Û
Samûyêl hemûya netewê, her kesî
şand malên xwe. 26 Û Saûl jî çû
Gîbeayê, mala xwe û egîdên ku
Xwedê dest li dilên wan dabû, pê re
çûn. 27 Lê belê hinek zilamên ku bi
kêr nayên gotin: Ma dê ev zilama,
çawa me xelas bike? Û wî biçûk
dîtin û xelatê jê re nebirin. Lê belê
Saûl, mîna ku nebihîstibe kir[2].

*Saûl Amoniyan têk dibe*

11 Û Ammonî Nahaş der-
ket û li dijî Yabeş-Gîleadê
artêşgehê danî û hemûya gelê
Yabeşê, ji Nahaş re gotin: Bi me re
sondê bide û em ê ji te re qûlitiyê
bikin. 2 Û Ammonî Nahaş ji wan
re got: Ez bi vê şerta bi we re sondê
bidim, ez çavên we yên hemûyan,
ên rastê derxînim ku vêya li ser Îs-
raêl bikim şermezariyek. 3 Û ka-
lepîrên Yabeşê jê re gotin: Heft rojî
destûrê bide me ku em şandiyan
bişînin hemû sînorên Îsraêl û ger
yekî ku me xelas bike tune be,
wê gavê em ê hilkişin cem te.
4 Û şandî hatin bajarê Gîbeaya
Saûl û van gotinana ji netewê re
gotin û hemûya netewê, bi denge-
kî bilind giriyan. 5 Û a vay, Saûl
li pêy ganêran ji zeviyê ve hat û
Saûl got: Ma ji netewê re çi bûye
ku digirîn? Û gotina Yabeşiyan
gîhandin wî.
6 Û gava van gotinan bihîst, Ruhê
Xwedê bihêz hate ser Saûl û hêrsa
wî zehf sor bû. 7 Û bi cotekî ganêr
ve girt û wan perçe perçe kir û wan
bi destê şandiyan şand hemûyê
sînorên Îsraêl û got: Her kî ku li pey
Saûl û li pey Samûyêl dernekeve,
dê ji gayên wan re wusa bête kirin!
Û tirsa XUDAN kete ser netewê û
mîna ku yek zilam bin derketin. 8 Û
di Bezekê de jimartin û lawên Îsraêl
sê sed hezar û zilamên Cihûda jî sîh
hezar kes bûn. 9 Û ji şandiyên ku
têne re gotin: Hûn ê ji Yabeş-Gîlea-

[1] Alavan.

[2] Guh neda wan.

diyan re wusa bibêjin: Sibê, dema
roj germ bibe, dê bona we bibe xe-
lasî. Û şandî hatin û ji Yabeşiyan re
gîhandin; ew jî kêfxweş bûn. 10 Û
Yabeşiyan, ji Ammoniyan re gotin:
Em ê sibehê derkevin cem we û hûn
ê hemû tiştên ku di çavên we de
qenc e, bi me re bikin. 11 Û wusa
bû ku, dotira rojê, Saûl netewê bi sê
liqan ve cuda kirin û di nobedari-
ya sibehê de ketin nava artêşgehê û
heta ku roj tîna xwe da li Ammoni-
yan xistin û wusa bû ku, yên ji ber
mayîne belav bûn û ji wan du kes
pev re[1] nema.
12 Û Netewe ji Samûyêl re got:
Ma yê ku digot: Qey dê Saûl li ser
me ve bibe qiral, kî bû? Ka wan
zilaman bidin me ku em wan bu-
kujin! 13 Û Saûl got: Îroj mirina
tu kesî nabe; ji ber ku îroj XU-
DAN li Îsraêl xelasiyê kir!
14 Û Samûyêl ji netewê re got: We-
rin, em herin Gîlgalê û li wê derê,
qiraletiyê nû bikin. 15 Û hemûya
netewê çûn Gîlgalê û li wê derê,
li Gîlgalê di hizûra XUDAN de
Saûl kirin qiral û li wê derê, li ber
XUDAN qurbanên selametê serjê
kirin û li wê derê Saûl û hemû Îs-
raêlî zehf kêfxweş bûn.

*Gotara Samûyêl*

12 Û Samûyêl ji hemûya Îsraêl
re got: A vay, di hemû tiştên
ku we ji min re gotin de, gotina
we guhdarî kirim û qiralekî danîm
ser we. 2 Û niha, a vay, qiral di
pêşiya we de dimeşe û ez kal bûm
û porê min sipî bû û a vay, lawên
min tevî we ne; ez jî ji zarokanti-
ya xwe, heta niha di pêşiya we de
meşiyam. 3 A vay, ma min gayê kî
rahişt? Û kerê kî rahiştim? Û mafê
kî xwarim? Û tengasiyê dame kî?
Û bona ku çav lê bigirim, ji destê
kî bertîlê stendim? Li ber XU-
DAN û li ber Mesîhê wî, li dijî
min şahdeyiyê bikin û ez bidim
we! 4 Û gotin: Te mafê me nexwar
û zorê li me nekir û ji destê tu kesî
tiştekî ranehişt. 5 Û ji wan re got:
XUDAN şahde ye ku we, li dijî
xwe di destê min de tiştekî nedîtin,
Mesîhê wî jî îroj şahde ye! Û wan
gotin: Ew şahde ye!
6 Û Samûyêl ji netewê re got: Yê
ku Mûsa û Harûn tayîn kiriye û
bapîrên me ji welatê Misirê ve
derxistiye XUDAN e. 7 Û niha
bisekinin, di derheqê hemû karên
rast de, ên ku XUDAN ji we û
bapîrên we re kirine, ez ji we re
li ber XUDAN nîşanan bînim.
8 Dema Aqûp hate Misirê, gava
bapîrên we ji XUDAN re qêriyan,
XUDAN Mûsa û Harûn şandin
û bapîrên we ji Misirê ve derxis-
tin û li vê derê dane rûniştandin.
9 Lê belê ew, Xwedayê xwe
XUDAN ji bîr kirin û XUDAN
wan ji Sîserayê serokê artêşa

1 Li cem hev.

Hatsor û ji Filistiyan û ji qiralê
Moabê re firotin û vana li hember
wan cengê kirin. 10 Û ji XUDAN
re qêriyan û gotin: Me sûc kirin,
ji ber ku me dev ji XUDAN
berdan û ji Baal û Astartiyan re
qûlitiyê kirin; lê belê niha me ji
destê neyarên me ve xelas bike
û em ê ji te re qûlitiyê bikin!
11 Û XUDAN Yerûb-Baal û
Bedan û Yeftah û Samûyêl şand
û ji her alî ve we ji destên neyarên
we ve xelas kir û hûn di ewlekariyê
de rûniştin. 12 Û dema we dîtin
ku Nahaşê qiralê lawên Ammon
bi ser we ve tê, dema Xwedayê
we XUDAN ji we re qiral bû, we
ji min re: Na, lê belê dê qiralek li
ser me qiraletiyê bike! gotin. 13 Û
niha, a vay, qiralê ku we bijartine
û jê hez kirin e! Û a vay, XUDAN
qiralekî danî serê we. 14 Ger hûn ê
ji XUDAN ve bitirsin û qûlitiyê jê
re bikin û gotina wî guhdarî bikin
û li dijî emrê XUDAN ranebin û
him qiralê ku dê li ser we qiraletiyê
bike, him jî hûn, ger hûn ê li pêy
Xwedayê xwe XUDAN bimeşin,
qenc e! 15 Lê belê ger hûn ê
gotina XUDAN guhdarî nekin û
li dijî emrê XUDAN rabin, wê
gavê dê destê XUDAN, mîna ku
li dijî bapîrên we bû, dê li dijî we
jî be. 16 Niha jî bisekinin û ev
tiştê mezin, ê ku dê XUDAN li
ber çavên we bike bibînin. 17 Ma
îroj ne çinandina genim e? Bona
ku gurmîniya ezmanan û baranê
bişîne, ez ê bangî XUDAN bikim
û hûnê bizanibin û bibînin ku,
ji xwe re qiral xwestina we, di
çavê XUDAN de xerabiyek çi
qas mezin e. 18 Û Samûyêl bangî
XUDAN kir û XUDAN wê rojê
gurmîniya ewran û baranê şand
û hemû netewe ji XUDAN û
Samûyêl ve zehf tirsiyan.
19 Û hemû netewe ji Samûyêl
re gotin: Bona qûlên xwe, li ber
Xwedayê xwe XUDAN bigere
ku em nemirin; ji ber ku me li ser
hemû sûcên xwe, xerabiya ji xwe
re qiralek xwestinê jî tevî wan
kirin! 20 Û Samûyêl ji netewê re
got: Metirsin, bi rastî jî we hemû
van xerabiyan kirin; lê belê ji pêy
XUDAN çewt nebin, tenê bi hemû
dilên xwe ji XUDAN re qûlitiyê
bikin 21 û çewt nebin; ji ber ku
wê gavê hûn ê li pêy tiştên vala ve
herin, ew tiştên ku fêde nadin û ni-
karin xelas bikin, ji ber ku vala ne.
22 Ji ber ku dê XUDAN, bona
navê xwe yî mezin netewa xwe
bernede, ji ber ku XUDAN bona
ku we ji xwe re bike netewe, qayîl
bû. 23 Lê ez jî bona we dev ji liber-
gerînê berdan, li dijî XUDAN sûc
kirin, bila ji min ve dûr bibe û ez
ê rêya rast û qenc hînî we bikim.
24 Lê ji XUDAN bitirsin û bi ras-
teqînî, bi hemû dilên xwe qûlitiyê
jê re bikin; ji ber ku lê binêrin, a
vay, bona we çi karên mezin çê

kirin! 25 Lê belê ger hûn xerabî
kirinê bidomînin, him hûn û him jî
qiralên we, hûn ê tune bibin!

*Samûyêl Saûl diazirîne*

13 Dema Saûl bû qiral (çel)[1]...
salî bû û paşî ku li ser Îsraêlê
du salî qiraletiyê kir, 2 Saûl bona
xwe ji Îsraêl ve sê hezar kes bijar-
tin, ji vana du hezar kes li Mîkmaşê
û li çiyayê Beytelê, li cem Saûl û
hezar kes li Gîbeaya Benyamîn, li
cem Yonatan bûn û yên ji ber ne-
tewê mayîne jî, her kes şandin ça-
dira xwe. 3 Û Yonatan, leşkerên
Filistiyan, ên ku li Gebayê ne xist û
Filistiyan vê yekê bihîstin. Û Saûl,
bi gotina: Bila Îbranî bibihîzin! li
hemûya welêt boriyê da lêxistin.
4 Û hemû Îsraêl gotina: Saûl li
leşkerên Filistiyan ve xist û Îsraêl
jî ji pozê Filistiyan ve gennî bûn
bihîstin. Û netewe li pêy Saûl ve li
Gîlgalê ve civiyan.
5 Û Filistiyan, bona ku bi Îsraêliyan
re cengê bikin civiyan, sîh hezar
erebeyên cengê û şeş hezar siwarî
û bi zêdeyî, gelekî mîna qûma li
qeraxa behrê û derketin û li rojhilata
Beyt-Avenê, li Mîkmaşê artêşgehê
danîn. 6 Û Îsraêliyan dîtin ku ew
bi xwe di tengasiyê de ne – ji ber
ku netewe aciz dibû – û netewe di
şikeftan de û di kelemiyan de û di
quntaran de û di kortalan de xwe
veşart. 7 Û hin kesên ji Îbraniyan
ji Urdunê derbasî welatê Gadê û
Gîleadê bûbûn; lê belê Saûl hîn
li Gîlgalê bû û li pêy wî, hemûya
netewê dilerizîn.
8 Û li gor wexta ku Samûyêl bi-
jartibû, heft roj sekinî; lê belê
Samûyêl nehat Gîlgalê û nete-
we ji cem wî belav dibûn. 9 Û
Saûl got: Pêşkêşiya şewitandinê
û pêşkêşiyên xweşiyê ji min re
bînin! Û pêşkêşiya şewitandinê
pêşkêş kir. 10 Û wusa bû ku,
dema pêşkêşkirina pêşkêşiya
şewitandinê qedand, a vay,
Samûyêl hat û Saûl, bona ku sila-
vê bide, ji pêrgîniya wî re derket.
11 Û Samûyêl: Te çi kir? got. Û
Saûl got: Ji ber ku dîtim, netewe
ji cem min ve belav dibûn û tu di
roja ku te digot de nehat û Filistî
li Mîkmaşê diciviyan 12 û gotim:
Niha dê Filistî dakevin Gîlgalê, bi
ser min ve werin, lê min jî xêra
XUDAN nexwestibû û zorê dam
xwe û pêşkêşiya şewitandinê
pêşkêş kirim! 13 Û Samûyêl ji
Saûl re got: Te bêaqilî kir; emrê
ku Xwedayê te XUDAN dabû te
negirt; ya na dê XUDAN, li ser
Îsraêl qiraletiya te abadîn pêdandî
bikira. 14 Lê belê, dê niha qira-
letiya te nesekine; XUDAN bona
xwe û li gor dilê xwe li zilamekî
geriya û XUDAN li ser netewa

1 Di nivîsa Îbranîtî de reqem nîne, bi texmînî hatiye danîn.

xwe, bi serokantî wî wezîfedar
kir, ji ber ku te bi tiştê ku XU-
DAN ji te re emir kiribû negirt.
15 Û Samûyêl rabû û ji Gîlgalê
derket Gîbeaya Benyamîn.
Û Saûl, netewa ku li cem wî ne
jimart, qasî şeş sed kesî bûn.
16 Û Saûl û lawê wî Yonatan û ne-
tewa ku li cem wan bûn, li Gebaya
Benyamîn ve rûdiniştin; Filistî
jî li Mîkmaşê artêşgehê danîn.
17 Û ji artêşgeha Filistiyan êrîşker
bi sê liqî derketin; liqek berê xwe
da rêya Ofra, welatê Şûalê 18 û li-
qek berê xwe da Beyt-Horonê û li-
qek jî berê xwe da ber bi çolê, rêya
sînorê ku li çemê Tseboîmê dinêre.
19 Û li hemûya welatê Îsraêl ve
hesinkar peyda nedibû; ji ber ku
Filistiyan: Bila Îbranî şûr an jî
rimê çênekin! gotibûn 20 û hemû
Îsraêlî, her kes bona ku xeparên
xwe û hesinê gîsnên xwe û bivirên
xwe tevirên xwe tûj bikin, dadike-
tin cem Filistiyan; 21 lê belê bona
tûj kirina teviran û bona hesinên
gîsnan û bona çetelan û bona bi-
viran û bona zixtên xwe yegeyên[1]
wan hebûn. 22 Û bi vî awayî, wusa
bû ku, di roja cengê de, di destê
hemû neteweya ku li cem Saûl û
Yonatan in de şûr û rim tune bûn;
tenê bi Saûl û bi lawê wî Yonatan
re hebûn. 23 Û leşkerên Filistiyan
hilkişiyan bihûrka Mîkmaşê.

[1] Mebred, çerx, an jî: Hesinê tûjkirinê.

*Şerê li dijî Filistiyan*

14 Û wusa bû ku, rojekê Yo-
natanê lawê Saûl, ji xulamê
ku çekdarê xwe ye re got: Were û
em herin leşkerên Filistiyan ên ku
li aliyê hember in. Lê belê ji bavê
xwe re negot. 2 Û Saûl, li qeraxa
Gîbea, di bin darê hinarê ya ku li
Mîgronê yî de rûniştî bû û netewa
ku li cem wî bûn qasî şeş sed kesî
bûn 3 û li Şîloyê, kahînê XUDAN
Ahiyayê lawê Ahîtûbûnê birayê
Îkabodê lawê Pînehasê lawê Elî
efod li xwe kiribû. Û netewe bi
çûna Yonatan ve nizanibûn. 4 Û
di nava bihurkên ku Yonatan bona
biçe cem leşkerên Filistiyan tê de
dixebitî, li aliyekî zinarekî tûj û li
aliyê din zinarekî tûj û navê yekê
Botsets û navê ya din Sene bû.
5 Yek ji zinaran, ji aliyê bakur ve, li
ber Mîkmaşê û zinarê din jî ji başûr
ve li ber Gebayê disekinîn.
6 Û Yonatan, ji xulamê ku çek-
darê xwe ye re got: Were, em he-
rin artêşgeha van bêsunetan; dibe
ku XUDAN bona me karekî bike;
ji ber, bona XUDAN, bi zêdeyi-
yê jî, bi kêmasiyê jî xelaskirinê
astengî nîne. 7 Û çekdarê wî jê re
got: Her tiştên ku di dilê te de yî
bike; bimeşe, a vay, li gor dilê te
ez bi te re me. 8 Û Yonatan got:
A vay, em herin cem van zilama-
na û ji wan re xuyanî bibin. 9 Ger
ji me re: Heta ku em werin cem
we, bisekinin! bibêjin wê gavê

em ê li cîhê xwe bisekinin û em
ê hilnekişin cem wan. 10 Lê belê
ger: Hilkişin cem me! bibêjin,
wê gavê em ê hilkişin; ji ber ku
XUDAN wan dane destên me û
dê ev ji bona me bibe nîşan. 11 Û
her du jî ji leşkerên Filistiyan re
xwe xuyanî kirin û Filistiyan go-
tin: A vay, Îbraniyan ji qulên ku
xwe veşartine derdikevin. 12 Û
leşkeran bersivê dan Yonatan û
çekdarê wî û gotin: Hilkişin cem
me, tiştên ku em ji we re bibêjin
hene! Û Yonatan ji çekdarê xwe
re got: Li pêy min were, ji ber ku
XUDAN wan dan destê Îsraêl.
13 Û Yonatan, li pêy wî çekdarê
wî, bi dest û lingên xwe hilkişiya
jorîn û li ber Yonatan ketin û li pêy
wî, çekdarê wî wan kuştin. 14 Û di
cîhekî qasî nîv donimî de, kuştina
pêşîn a ku Yonatan çêkir qasî bîst
kesî bû. 15 Û di artêşgehê de, di
beyar û nava hemûya netewê de
lerizînek bû; leşker û êrişker jî
lerizîn û erd lerizî û lerizandinek
zehf mezin çêbû.
16 Û nobedarên Saûl, ên ku li
Gîbeaya Benyamîn in nihêrtin û a
vay, ajawe belav dibû û wir û vir
de diçûn. 17 Û Saûl, ji netewa ku
li cem wî ne re got: Niha bijmêrin,
binêrin kî ji nav me çû. Û gava ji-
martin, a vay, Yonatan û çekdarê
wî tune bûn. 18 Û Saûl ji Ahiya re:
Sindoqa Xwedê bîne! got. Ji ber
ku di wan rojan de Sindoqa Xwe-
dê li wir, li cem lawên Îsraêliyan
bû. 19 Û wusa bû ku, dema Saûl
ji kahîn re digot, galegal û gurmî-
niya di artêşgeha Filistiyan de her
ku diçû zêde dibû û Saûl ji kahîn re
got: Destê xwe bikişîne! 20 Û Saûl
û hemûya netewa ku li cem wî bûn
civiyan û ketin cengê û a vay, di Fi-
listiyan de şûrê her kesî, li dijî he-
valê xwe bû û şaşîtiyek zehf mezin
hebû. 21 Û Îbraniyên ku ji berê de
bi Filistiyan re bûn, tevî wan, ji dorê
ve derketibûn artêşgehê; vana jî
tevî Îsraêliyên ku bi Saûl û Yonatan
re bûn. 22 Û hemû Îsraêliyên ku li
çiyayiya Efrayîm ve xwe veşartine,
gava bihîstin ku Filistî reviyane ew
jî li pêy wan ketin û dest bi cengê
kirin. 23 Bi vî awayî XUDAN wê
rojê Îsraêliyan xelas kirin û ceng ji
Beyt-Avenê wêdetir çû.
24 Û Îsraêliyan wê rojê zehf
westiyan; ji ber ku Saûl, bi go-
tina: Heta ku bibe êvar û heta ku
ez ji neyarên xwe ve tolê hilînim
her kî nan bixwe, bila bi nalet be!
bi netewê ve sondê dabû xwarin.
Û ji hemû netewê, kesî nan tahm
nekir. 25 Û hemûya netewê ke-
tin daristanê û li rûyê axê hungiv
hebû. 26 Û gava netewe kete da-
ristanê, a vay, hungiv dilop dibû;
lê belê yê ku destê xwe bir devê
xwe nîn bû; ji ber ku netewe ji
sondê ve ditirsiya. 27 Lê belê Yo-
natan, nebihîstibû ku bavê wî bi
netewê ve sondê daye xwarin û

çoyê ku di destê xwe de yî dirêj
kir û di dilopa hungivê de rakir û
destê xwe bir devê xwe û çavên
wî ronî bûn. 28 Û ji netewê yekî
bersivê dayê û got: Bavê te bi
gotina: Her kî ku îroj nan bixwe,
bila bi nalet be! sondekê giran bi
netewê re da xwarin. Û netewe ji
bîr ve çûyî bû. 29 Û Yonatan got:
Bavê min tengasiyê da welêt; ez
rica dikim binêrin, çawa hinekî ji
vî hungivî tahm kirim, nûr hate
çavên min. 30 Ger îroj ji talana ku
ji neyarên xwe stendiye, netewe,
yê ku dîtiye têra xwe bixwara dê
çi biba! Ji ber ku di nav Filistiyan
de, têra xwe şikestin nebû.
31 Û wê rojê ji Mîkmaşê, heta
Ayalonê li Filistiyan xistin. Û ne-
tewe zehf ji bîr ve çûyî bû 32 û ne-
tewê xwe avêtin ser malê talanê û
mîhan û ganêran û golikan rahiştin
û li ser axê ve serjê kirin û netewe,
wan tevî xwîna wan xwarin. 33 Û
gîhandin Saûl û gotin: A vay, ne-
tewe goşt tevî xwîna wê dixwin û
li hember XUDAN sûcê dikin. Û
wî got: We xayîntiyê kirin! niha
kevirekî mezin bigindirînin cem
min! 34 Û Saûl got: Di nava ne-
tewê de belav bibin û ji wan re bi-
bêjin: Bila her kes gayê xwe û her
kes mîhên xwe bînin cem min û li
vir serjê bikin û bixwin û bi xwîna
wê xwarinê, li dijî XUDAN sûcê
mekin. Û wê şevê hemû netewe,
her kes ganêrê xwe bi destê xwe
ve anîn û li wir serjê kirin. 35 Û
Saûl pêşkêşîgehekê ji XUDAN re
çêkir; pêşkêşîgeha pêşîn ya ku ji
XUDAN re çêkiriye ev bû.
36 Û Saûl got: Li pêy Filistiyan
em êvarê dakevin û heta tîrêja
sibehê em di nava wan de talanê
bikin û kesî ji wan bernedin! Û
gotin: Heçiyên di çavên te de qenc
e, hemûyî bike. Û Kahîn got: Em
nêzîkî vir, ber Xwedê bibin! 37 Û
Saûl ji Xwedê ve pirsî: Ma gelo ez
li pêy Filistiyan dakevim? Tuyê
wan bidî destê Îsraêliyan? Lê belê
wê rojê bersivê neda wî. 38 Û Saûl
got: Ya hemû serokên netewê,
nêzîkî vir bibin, îroj bizanibin ku
ev sûc bi çî ye bizanibin û bibînin.
39 Ji ber ku bona heqê XUDANê
Îsraêl xelas kiriye û zindî ye, ger
lawê min Yonatan jî be, dê mu-
heqeq bimire! Lê belê ji hemûya
netewê, yekî ku bersivê bide wî
tunebû. 40 Û ji hemûya Îsraêl re
got: Hûn li aliyekê bin û ez û lawê
xwe Yonatan li aliyekî bin. Û ne-
tewe ji Saûl re gotin: Tiştê ku di
çavê te de qenc e bike. 41 Û Saûl
ji Xwedayê Îsraêl XUDAN re:
Rastiyê nîşan bide! got. Û Yonatan
û Saûl bi pişkê ve hatin girtin; lê
belê netewe xelas bû. 42 Û Saûl
got: Di nava min û lawê min Yo-
natan de peşkê bavêjin! Û Yonatan
hate girtin.
43 Û Saûl ji Yonatan re got: Te çi kir,
ji min re bibêje. Û Yonatan agahî wî

kir û got: Bi rastî, min bi serê çoyê
ku di destê min de ye hinek hungiv
tahm kir û a vay, divê ez bimirim!
44 Û Saûl got: Bila Xwedê wusa û
zêdetir bike; ji ber ku Yonatan, tuyê
muheqeq bimire! 45 Û netewe ji
Saûl re gotin: Ma Yonatanê ku di Îs-
raêlê de vê xelasiya mezin çêkiriye,
dê bimire? Bila dûr be; bona heqê
XUDANê ku zindî ye, dê ji serê wî
mûyek jî nekeve erdê; ji ber ku îroj
bi Xwedê re kar kir! Bi vî awayî
netewe Yonatan xelas kirin û ew
nemir. 46 Û Saûl ji pêy Filistiyan
vegeriya û Filistî çûn cîhên xwe.
47 Û Saûl li ser Îsraêl qiraletiyê
rahişt û li dijî hemû neyarên xwe
yî dor û berê, li dijî Moab û li dijî
lawên Ammon û li dijî Edom û li
dijî qiralên Tsoba û li dijî Filisti-
yan cengê kir û bi kîjan alî ve zi-
virî, bi ser ve ket. 48 Û egîdiyan
kir û li Amalekiyan xist û Îsraêlê,
ji destên talankiran ve xelas kir.
49 Û lawên Saûl; Yonatan û Îşvî û
Malkîşûa bûn û navê her du qîzên
wî jî ev bûn: Navê ya pêşiyê Me-
rab û navê ya biçûk Mîkal 50 û
navê pîreka Saûl Ahînoama qîza
Ahîmaats bû. Û navê serokê artêşa
wan jî, Abnerê lawê apê Saûlê Ner
bû. 51 Û Kîş bavê Saûl bû û Nerê
bavê Abner, lawê Abîêl bû.
52 Û di hemûya rojên Saûl de, li
dijî Filistiyan cengek dijwar hebû
û Saûl, gava egîdek, an jî zilamek
dilawêr bitîda, wî digirt cem xwe.

*Saûl ji Qiraletiyê tête red kirin*

5.Mûs 25,17-19

15 Û Samûyêl ji Saûl re got:
XUDAN, bona ku li ser ne-
tewa xwe, li ser Îsraêl bi qiraleti-
yê te mesh bike min şand û niha
gotinên XUDAN guhdarî bike.
2 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Ez ê, li tiştê ku Amalek ji Îsraêl re
kir, gava ji Misirê ve derket, çawa
li dijî wî sekiniye, bigerim. 3 Niha
here, li Amalek bixe û her tiştên
wan bitûmî tune bike û wan ne-
parêze û ji zilam ve heta pîrekê, ji
zarokan, heta yên ku di pêsîrê de
ne, ji ganêr heta mîhê, ji devê heta
keran, hemûyan bikuje!
4 Û Saûl bangî netewê kir û li
Telaîmê wan jimart, du sed hezar
peya û ji Cihûda ve deh hezar kes.
5 Û Saûl hate bajarê Amalek û li
geliyê kemînê danî. 6 Û Saûl ji
Keniyan re got: Herin, cihê bibin,
ji nava Amalekiyan ve dakevin ku
ez we jî tevî wan helaq nekim; ji
ber ku dema ji Misirê derketin, we
qenciyê li hemû lawên Îsraêl re
kirin. Û Kenî ji nav Amalekiyan
cuda bûn. 7 Û Saûl ji Havîlayê,
heta bigihêje Şûra ku li ber Misirê
ye, li Amalekiyan ve xist. 8 Û
Agagê qiralê Amalekiyan, bi zindî
hişt û hemûya netewê, bitûmî ji
şûr ve derbas kir. 9 Lê belê Saûl
û netewe; Agag û heçiyên qencên
mîh û ganêran û yên heywanên
qelew parastin û nexwestin ku

wan bi tûmî tune bikin; lê belê
her tiştên ku bêqîmet û lawaz in,
bi tûmî tune kirin.
10 Û ev gotina XUDAN ji
Samûyêl re hat: 11 Ez ji qiral ki-
rina Saûl re poşman bûm, ji ber
ku êdî ji pêy min vegeriya û bi
gotina min ve negirt. Û Samûyêl
hêrs bû û di hemûya şevê de ha-
warê ji XUDAN re kir. 12 Û bona
ku sibehê pêrgîniyê ji Saûl re
bike, Samûyêl zû rabû û gîhandin
Samûyêl û jê re gotin: Saûl hate
Karmelê û ji xwe re abîdeyek
çikand û vegeriya û derbas bû û
daket Gîlgalê. 13 Û Samûyêl hate
cem Saûl û Saûl jê re got: Tu ji ali-
yê XUDAN ve pîroz bibe; gotina
XUDAN girtim! 14 Û Samûyêl
got: Wê gavê ev merîna mîhan û
qorîna ganêran ên ku tên guhên
min çi ne? 15 Û Saûl got: Wan ji
Amalekiyan ve anîn; ji ber ku ne-
tewe, bona ku ji Xwedayê te XU-
DAN re qurban bike, herî qencên
mîh û ganêran parastin û yên ku ji
ber mayîne, me bi tûmî tune kirin.
16 Û Samûyêl ji Saûl re got: Bi-
sekine ku ez tiştê îşev XUDAN ji
min re gotiye, bighînim te! Wî jê
re got: Bêje!
17 Û Samûyêl got: Ma çawa ku
tu di çavê xwe de biçûk bû, lê
dîsa tu nebû serokê eşîrên Îsraêl?
Û XUDAN te li ser Îsraêlê
bi qiraletiyê ve mesh kir 18 û
XUDAN te şand rê û got: Here û
sûcdaran û hemûyên Amalekiyan
bitûmî tune bike û heta ku tu bi
tûmî wan biqedîne, li hember wan
cengê bike. 19 Û ma çima te gotina
XUDAN guhdarî nekir û xwe êrîşî
malê talanê kir û tiştê ku di çavê
XUDAN de xerab e kir? 20 Û Saûl
ji Samûyêl re got: Belê, gotina
XUDAN guhdarî kirim û ez di
rêya ku XUDAN min şandiye de
çûm û Agagê qiralê Amalekê yî
anîm û Amalekiyan bitûmî tune
kirim. 21 Lê belê netewe, ji malên
talanê ve mîh û ganêran, sereka
tiştên ku hatine tirxan kirin, bona
ku ji Xwedayê te XUDAN re li
Gîlgalê qurban bikin, rahiştin. 22 Û
Samûyêl got: Ma XUDAN qasî ku
ji guhdarî kirina gotina xwe ve hez
dike; dê ji pêşkêşiyên şewitandinê
û ji qurbanan jî hez bike? A vay,
îtaet kirin ji qurbanê û guhdarî
kirin ji bezên hundirê beranan ve
çêtir e. 23 Ji ber ku serîhildan mîna
sûcê falbêjiyê ye û înyad kirin jî
mîna senemperestî û terafîmî ye.
Madem ku te gotina XUDAN red
kir, ew jî te ji qiraletiyê ve red kir.
24 Û Saûl ji Samûyêl re got: Sûc
kirim; ji ber ku ji emrê XUDAN
û ji gotinên te ve wêdetir çûm, ji
ber ku ji netewê tirsiyam û go-
tinên wan guhdarî kirim. 25 Û
niha, ez rica dikim, li sûcê min
biborîne û tevî min şunda vegere
ku ez ji XUDAN re secde bikim.
26 Û Samûyêl ji Saûl re got: Ez

bi te re venagerim; ji ber ku te go-
tina XUDAN red kir, XUDAN jî,
bona ku tu li ser Îsraêlê ve nebe
qiral, te red kir. 27 Û Samûyêl,
dema bona ku here zîvirî, Saûl bi
kirasê cubbeya wî ve girt û ew çi-
riya. 28 Û Samûyêl jê re got: Îro
XUDAN, ji ser te ve qiraletiya Îs-
raêl çirand û wê da yê ji te qenctir
e, da cîranekî te. 29 Û Yê ku Îs-
raêl pê bawer e jî derewan nabêje
û poşman nabe; ji ber, ne mirov e
ku poşman bibe. 30 Û got: Sûc ki-
rim û li ber Îsraêl hurmetê li min
bike û bi min re şunda vegere û ez
ji Xwedayê te XUDAN re secde
bikim. 31 Û Samûyêl li pêy Saûl
ve şunda vegeriya û Saûl ji XU-
DAN re secde kir.
32 Û Samûyêl got: Agagê qiralê
Amalekê bînin vê derê. Û Agag
bi kêfxweşî hate cem wî. Û Agag
digot: Muheqeq êşa mirinê derbas
bûye! 33 Û Samûyêl got: Çawa
ku şûrê te pîrekan bê zarok hiştî
be, dê dayika te jî di nava pîre-
kan de wusa bê zarok bimîne! Û
Samûyêl, li Gîlgalê, li ber XU-
DAN Agag perçe kir.
34 Û Samûyêl çû Ramayê û Saûl
hilkişiya mala xwe, Gîbeaya Saûl.
35 Û heta roja ku mir, Samûyêl
carekî din bona dîtina Saûl ne-
hat; ji ber ku Samûyêl bona Saûl
şînê dikişand. Û XUDAN, ji ber
ku Saûl li ser Îsraêl kiriye qiral,
poşman bû.

*Dawid bi Qiraletiyê tête Meshkirin*

16 Û XUDAN ji Samûyêl re
got: Çawa ku bona li ser
Îsraêl nebe qiral Saûl red kirim,
tuyê heta kengê şîna wî bikişînî?
Qiloçê rûnê bi rûn bike, dagire û
here; ez ê te ji Îşayê Beytlehemî
re bişînim; ji ber ku di nava lawên
wî de, bona xwe qiralekî amade
kirim. 2 Û Samûyêl got: Ez çawa
herim? Ger Saûl bibihîze, dê ew ê
min bukuje. Û XUDAN got: Go-
likekê bigire cem xwe û: Bona ku
ji XUDAN re bikim qurban ha-
time bibêje. 3 Û Îşay, bangî qur-
banê bike û tiştên ku tuyê bikî, ez
ê bigehînim ji te re û zilamê ku ez
ê ji te re bibêjim, tuyê bona min
mesh bike. 4 Û Samûyêl, tiştê ku
XUDAN gotibû kir û hate Beyt-
lehemê. Û kalepîrên bajêr, bi leri-
zînê ve hatin pêrgîniya wî û gotin:
Ma tu ji bo aştiyê tê? 5 Û wî got:
Belê, ji bo aştiyê! Bona ku qur-
banê bidim XUDAN hatime; xwe
pîroz bikin û bi min re werin qur-
banê! Û Îşay û lawên wî pîroz kir
û wan bangî qurbanê kir.
6 Û wusa bû ku, dema hatin,
li Elîab nihêrt û got: Bi rastî jî
Mesîhê XUDAN li ber wî ye! 7 Lê
belê XUDAN ji Samûyêl re got: Li
xuyanîbûna wî û dirêjiya qama wî
nenihêre; ji ber ku wî red kirim; ji
ber ku XUDAN, mîna dîtina miro-
van nabîne; ji ber ku mirov li wec
dinêre, lê belê XUDAN li dil dinê-

re. 8 Wê gavê Îşay bangî Abînadab
kir û wî ji ber Samûyêl ve derbas
kir. Û got: XUDAN wiya jî nebi-
jartiye. 9 Û Îşay Şamma derbas kir.
Û got: XUDAN wiya jî nebijarti-
ye. 10 Û Îşay ji lawên xwe heft he-
ban ji ber Samûyêl ve derbas kir.
Û Samûyêl got: XUDAN wana
nebijartiye. 11 Û Samûyêl ji Îşay
re got: Ma zarokên te hemû ev in?
Û wî got: Hîn yê herî biçûk heye
û a vay, mîhan dajo. Û Samûyêl ji
Îşay re got: Bişîne û wî bîne; ji ber
ku heta ew neyê vir, em ê li xwa-
rinê rûnenin! 12 Û şand û wî anî
hundir. Ew bi xwe sorik, çavên wî
jî xweşik û lê nihêrtîn xweş bû. Û
XUDAN got: Rabe, wî mesh bike!
Ji ber ku ev, ew e. 13 Û Samûyêl
qiloçê rûnê rahişt û di nava birayê
wî de, wî mesh kir û ji wê rojê dest
pê kir û Ruhê XUDAN bihêz hate
ser Dawid. Û Samûyêl rabû û çû
Ramayê.

*Dawid ji Saûl re li Çenkê dixe*

14 Û Ruhê XUDAN ji Saûl ve
veqetiya û ji aliyê XUDAN ve ru-
hekî xerab wî dikesirand. 15 Û qûlên
Saûl jê re gotin: A vay, niha ji aliyê
Xwedê ve ruhekî xerab te dikesirînî.
16 Efendiyê me, bila ji qûlê ku li ber
wî ne re emir bike, bila li zilamekî
ku qenc li çenkê[1] dixe bigerin û dê
wusa bibe ku, dema ji aliyê Xwedê
ve ruhê xerab bi ser te ve were, dê
bi destê xwe lê bixe û tuyê baş bibe.
17 Û Saûl ji qûlên xwe re got: Niha
bona min, zilamekî ku qenc lê dixe
amade bikin û ji min re bînin. 18 Û
ji xortan yekî bersivê da û got: A
vay, min lawekî Îşayê Beytlehemî,
ê ku qenc li çenkê dixe dît û ew
egîdek dilawêr û mêrê cengê û
zilamek bedew û di gotina xwe de
baqil e û XUDAN bi wî re ye. 19 Û
Saûl şandiyan şand cem Îşay û got:
Lawê xwe Dawid, ê ku li cem mîha
ye, ji min re bişîne. 20 Û Îşay nan
û hebaneke xemr û karikekê rahişt
tevî ker, bi destê lawê xwe Dawid
ve ji Saûl re şand. 21 Û Dawid hate
cem Saûl û li ber wî sekinî û zehf ji
Dawid ve hez kir û ew bû çekdarê
Saûl. 22 Û Saûl ji Îşay re şand û jê
re got: Ez rica dikim, bila Dawid li
ber min bisekine, ji ber ku di çavê
min de xêrê dît. 23 Û wusa bû ku,
dema ji aliyê Xwedê ve, ruhê xerab
bi ser Saûl ve hat, Dawid çenkê
radihişt, bi destê xwe ve lêdixist
û Saûl radiwestiya û qenc dibû û
ruhê xerab jê ve cuda dibû.

*Dawid Golyat dikuje*

17 Û Filistiyan, bona cengê
artêşên xwe civandin û li
Sokoya bajarê Cihûda ve civiyan
û di navbera Soko û Azekayê de,
di Efes-Dammîmê de artêşgehê
danîn. 2 Û Saûl û zilamên Îs-
raêl civiyan û di geliya Elayê de

[1] Lîr.

artêşgehê danîn û li hember Filis-
tiyan, bona cengê rêz bûn. 3 Û
Filistî li çiyê, di aliyekî de dise-
kinîn û Îsraêlî li çiyê di aliyê din
de disekinîn û di navbera wan de
çem hebû. 4 Û ji artêşgeha Filisti-
yan pêlewanek Gatî, ê ku navê wî
Golyat bû derket, qama wî şeş
gez[1] û bihostek bû. 5 Û di serê wî
de serpûşekî ji tûncê hebû û zir-
xekî pel pelî li xwe kiribû; gira-
niya zirxê pênc hezar şekel tûnc
bû. 6 Û li ser teşikên wî zirxên
tûncî hebûn û di nava serpiyên
wî de rima tûnc hebû. 7 Û destê
rima wî, mîna rewtê dezga culhê
bû û serê rima wî, di hesinekî di
giraniya şeş sed şekelî de bû û xu-
lamê wî, ê ku mertalê rahiştibû,
di pêşiya wî de diçû. 8 Û sekinî
û bangî rêzên Îsraêliyan kir û ji
wan re got: Ma çima hûn bona ku
ji cengê re rêz bibin derketin? Ma
ez ne Filistî me û hûn jî ne qûlên
Saûl in? Bona xwe zilamekî hil-
bijêrin ku bila dakeve cem min!
9 Ger bikaribe bi min re cengê
bike û li min bixe, wê gavê em ê
ji we re bibin qûl; lê belê ger ez
li hember wî bi serkevim û li wî
bixim, wê gavê jî hûn ê ji me re
bibin qûl û qûlitiyê ji me re bikin.
10 Û Filistî got: Îroj, ez ji rêzên
Îsraêl re qadê dixwazim, zilamekî
bidin min ku em li dijî hev cengê
bikin! 11 Û gava van gotinên Fi-
listî bihîstin, Saûl û hemû Îsraêl
ketin bêzariyê û zehf tirsiyan.
12 Û Dawid, lawê Îşayê Efratiyê
ku ji Beytlehem-Cihûdayê ye bû
û heyşt lawên vî zilamî hebûn û
di rojên Saûl de kal bûbû, di nava
zilaman de, ji aliyê temenê ve
pêş ve çûbû. 13 Û her sê lawên
Îşay yên mezin, li pêy Saûl çûbûn
cengê û navê her sê lawên wî, ên
ku çûbûn cengê ev bûn: Yê pêşiyê
Eliyab û yê duwem Abînadab û
yê sêwem Şamma. 14 Û Dawid,
yê herî biçûk bû û her sê lawên wî
ên mezin li pêy Saûl çûbûn. 15 Û
Dawid, bona ku mîhên bavê xwe
ên li Beytlehemê ne bajo, ji cem
Saûl diçû û dihat. 16 Û Filistî, çel
roj; bi şev û roj pêş ve diçû û li
hember wan disekinî.
17 Û Îşay ji lawê xwe Dawid re
got: Niha, bona birayên xwe, ji vî
genimê qelandiye efayekî û vî deh
nanî rahêle û bazde artêşgehê, cem
birayên xwe 18 û vî deh parî penêrî
ji fermandar re bibe û rewş û xatirê
birayên xwe bipirse û ji wan ve
nîşanekê rahêle. 19 Û ew û Saûl
û hemû zilamên Îsraêl, di newala
Elayê de bi Filistiyan re cengê di-
kirin. 20 Û Dawid sibehê zû rabû
û mîhan danî cem notirvan û mîna
ku Îşay emir dabû wî rahişt û çû û
dema hat artêşgeha erebeyan, artêş
derdiket qada cengê û bona cengê
diqêriyan. 21 Û Îsraêlî û Filistî,

1 Li rasteka menan binêrin.

bona ku rêz bi rêz bên hemberî hev, rêz bûn. 22 Û Dawid, pertalên xwe da destê notirvanên pertalan û baz da rêzê û hat û rewş û xatirên birayên xwe pirsîn. 23 Û dema bi wan re dipeyivî, a vay, pêlewanê Gatî, ê Filistî, yê ku navê wî Golyat bû, ji rêza Filistiyan ve derket û mîna gotinên berê got û Dawid bihîst. 24 Û gava hemû Îsraêlî zilam dîtin ji ber wî reviyan û zehf tirsiyan. 25 Û Îsraêliyan gotin: We vî zilamê ku derket dîtin? Bi rastî, bona ku qadê ji Îsraêl bixwaze derdikeve û dê wusa bibe ku, her kî ku li wî bixe, dê qiral bi dewlemendiyekî mezin wî dewlemend bike û qîza xwe bide wî û mala bavê wî li Îsraêl serbest bihêle. 26 Û Dawid, bi zilamên ku li cem wî sekinîne re axifî û got: Dê çi ji zilamê ku li vî Filistiyî bixe û şermezariyê ji Îsraêlê ve rake bête kirin? Ji ber ku ev Filistiyê bêsunet, ê ku ji rêzên Xwedayê ku zindî ye re, qadê dixwaze kî dibe? 27 Û netewe, bi gotina: Dê ji zilamê ku lê bixe re wusa bête kirin, li gor wê gotinê jê re gotin.

28 Û dema bi zilaman re diaxifî, birayê wî yî mezin Eliyab bihîst û li dijî Dawid, hêrsa Eliyab sor bû û got: Çima tu daket? Û wan çend mîhan li çolê te ji kê re hişt? Ez bi qurretiya te û xerabiya dilê te dizanim, muheqeq tu bona dîtina cengê daketî yî. 29 Û Dawid got: Ma niha çi kirim? Lê tenê ne gotinek e? 30 Û ji cem wî vegeriya û eynî gotinê ji yekî din re jî got û netewe, mîna ku berê gotibûn, bersivê dan wî.

31 Û dema gotinên ku Dawid gotine hatin bihîstin, wan gîhandin Saûl. 32 Û Dawid ji Saûl re got: Bila ji ber wî zilamî, tu dilê kesekî lawaz nebe, dê qûlê te here û bi vî Filistiyî re cengê bike! 33 Û Saûl ji Dawid re got: Bona ku bi vî Filistiyî re cengê bikî, tu nikarî biçe hember wî; ji ber ku tu ciwan î, lê belê ew ji ciwantiya xwe de zilamê cengê ye. 34 Û Dawid ji Saûl re got: Qûlê te, mîhên bavê xwe dajot û gava şêrek, an jî hirçek bihata û ji keriyê berxikekê rahişta, 35 ez jî li pêy wî diçûm û li wî dixistim û berxikê ji devê wî ve xelas dikirim û ger li dijî min rabûna, ji rîha wî ve digirtim û li wî dixistim û dukuştim. 36 Qûlê te him li şêr û him jî li hirçê xistiye û ev Filistiyê bêsunet, dê bibe yekî mîna wan, ji ber ku qadê ji rêzên Xwedayê ku zindî ye ve xwestiye! 37 Û Dawid got: XUDANê ku min ji destê şêr û hirçê xelas kiriye, dê ji destê vî Filistiyî jî xelas bike. Û Saûl ji Dawid re got: Here û bila XUDAN bi te re be! 38 Û Saûl kincê xwe li Dawid kir û serpûşa tûncî li serê wî kir û zirxê li wî kir. 39 Û Dawid şûrê xwe li ser kincên xwe ve dakir û

bona meşînê xebitî[1], ji ber ku ne
elimî bû. Û Dawid ji Saûl re got:
Ez nikarim bi vana re bimeşim; ji
ber ku fêr nebûme. Û Dawid wan
ji xwe kirin. 40 Û çoyê xwe rahişt
û ji geliyê pênc heb kevirê çeqilê
rahişt û wan xist kîsê şivaniyê,
cuhera ku li ser wî ye û qûsikê
wî di destê wî de bû û nêzîkî yê
Filistî bû.
41 Û Filistî dimeşiya û dihat û
nêzîkî Dawid dibû û xulamê ku
mertalê wî hilgirtibû li pêşiya wî
bû. 42 Û Filistî li dora xwe nihêrt
û gava Dawid dît, wî mîna zilamekî
nehesiband; ji ber ku ciwan û rûso-
rik û nêrîna wî jî xweşik bû. 43 Û
Filistî ji Dawid re got: Ma qey ez
kûçik im, tu bi ço hatiye dora min?
Û Filistî, bi îlahên xwe ve ji Dawid
re naletê kir. 44 Û Filistî ji Dawid
re got: Were cem min ku ez goştê te
bidim civîkên ezmanan û heywanên
beyaran! 45 Û Dawid ji yê Filistî
re got: Tu bi şûr û rim û mircaqê
bi ser min ve tê; lê belê ez bi navê
Xwedayê rêzên Îsraêl, XUDANê
artêşan, ê ku te jê qadê dixwest têm
ser te. 46 Dê îroj XUDAN te bide
destê min û ez ê li te bixim û serê
te ji gewda te biqetînim û ez ê laşên
artêşên Filistiyan bidim civîkên ez-
manan û cenawirên erdê û dê hemû
cîhan pê bizanibe ku di Îsraêl de
Xwedê heye 47 û dê hemû ev civak
pê bizanibe ku, XUDAN bi şûr û
rimê xelas nake; ji ber ku ceng ya
XUDAN e û dê we bide destê me!
48 Û wusa bû ku, bona ku derkeve
hember Dawid, gava Filistî rabû û
nêzîkî hat, Dawid lez kir û bona ku
derkeve ber Filistî, berbi rêza cengê
baz da. 49 Û Dawid dest avêt cu-
herê xwe û ji wir kevirekî rahişt û
bi qûsikê avêt û ji eniya wî ve, li yê
Filistî xist û kevir bi eniya wî ve çû
û bi ser rûyê xwe ve ket erdê.
50 Û Dawid bi qûsik û kevir yê
Filistî bi bin ve xist û li yê Filistî
xist û wî kuşt û di destê Dawid de
şûr tunebû. 51 Û Dawid baz da
û li ser yê Filistî sekinî û şûrê wî
rahişt û ji kalanê wî derxist û wî
kuşt û bi wê, serê wî jêkir. Û gava
yên Filistî dîtin ku pêlewanê wan
hate kuştin, reviyan. 52 Û zilamên
Îsraêl û Cihûda rabûn û qêriyan û
heta bigihêje Gaiyê û heta deri-
yên Ekronê bera Filistiyan dan. Û
yên ku ji Filistiyan hatibûn lêxis-
tin heta Gatê û heta Ekronê ketin
rêya Şaarayîmê. 53 Û lawên Îsraêl
ji beradana pêyî Filistiyan berdan,
vegeriyan û artêşgeha wan talan
kirin. 54 Û Dawid, serê yê Filistî
rahişt û wê anî Orşelîmê; lê belê
çekên wî, danîn çadira xwe.
55 Û Saûl, gava dît ku Dawid li
dijî Filistî rabû; ji Abnerê serokê
artêşgehê re: Ya Abner, ma ev ci-
wana lawê kî ye? got. Û Abner got:
Bona mafê jiyana te ya qiral, ez ni-

1 An jî: Bona ku bimeşe şuxulî.

zanim! 56 Û qiral got: Bipirse, gelo
ev lawik kurê kî ye? 57 Û gava Da-
wid li Filistî xist û vegeriya, Abner
wî girt û bir cem Saûl û serê Filistî
di destê wî de bû. 58 Û Saûl jê re
got: Ya zilamê ciwan, ma tu lawê
kî yî? Û Dawid got: Ez lawê qûlê
te, Îşayê Beytlehemî me.

*Yonatan bi Dawid re Peymanekê dike*

18 Û gava ji Saûl re gotinê qe-
dand, canê Yonatan bi canê
Dawid ve hate girêdan û Yonatan
mîna canê xwe jê hez kir. 2 Û Saûl
wê rojê wî girt û nehişt ku vegere
mala bavê xwe. 3 Û Yonatan bi
Dawid re sondê da, ji ber ku mîna
canê xwe jê hez dikir. 4 Û Yonatan
cibba ku li pişta xwe yî derxist û
wê û heta bigihêje şûr û kevan û
şûtika xwe kincê xwe da Dawid.
5 Û Dawid hilkişiya her derê ku
Saûl wî şandiye û bi baqilî kir û
Saûl wî danî ser zilamên cengê
û ev, di çavên hemû netewê de û
di çavên qûlên Saûl de qenc hate
xuya kirin.

*Saûl çavnebariyê li Dawid dike*

6 Û dema Dawid li Filistî xist
û vegeriya, gava ew dihatin, ji
hemû bajarên Îsraêl pîrekan, bona
ku pêşwaziyê ji Saûl re bikin, bi
tefan, bi kêfxweşî û sazên sê têlî
bi sitrandin û reqisînê ve derketin.
7 Û dema pîrek dilîstin, li hember
hev distirîn û digotin:
Saûl li hezarên wan xistin; Dawid
jî li deh hezarên wan.
8 Û Saûl zehf hêrs bû û ev gotin
di çavê wî de xerab xuya bû û got:
Deh hezaran dan Dawid, lê tenê
hezaran dan min û êdî tenê qira-
letî ji wî re maye! 9 Û ji wê rojê
wê de bi çavekî xwar li Dawid
nihêrt.
10 Û dotira rojê, ji aliyê Xwedê
ve ruhekî xerab bi hêz û xwurtiyê
hate ser Saûl û di navenda malê
de pilepil dikir; Dawid jî mîna her
rojî dikir, bi destê xwe ve li çenkê
dixist. Û di destê Saûl de rim hebû
11 û Saûl bi gotina: Ez Dawid bi
dîwêr ve bukutim, rimê avêt. Lê
belê, Dawid ji ber wî ve du carî
xwe da alî. 12 Û Saûl ji Dawid ve
tirsiya, ji ber ku XUDAN bi wî
re bû û ji Saûl veqetiyabû. 13 Û
Saûl wî ji cem xwe bi dûr ve xist
û wî ji xwe re kir serdar[1] û Dawid
li ber netewê derdiket û diketê.
14 Û Dawid di hemûyên rêyên
xwe de bi baqilî kir û XUDAN
bi wî re bû. 15 Û Saûl bi baqilî
kirina wî didît û ji wî bêzar dibû.
16 Û hemûya Îsraêl û Cihûda ji
Dawid hez dikirin; ji ber ku li ber
wan derdiket û diket.
17 Û Saûl ji Dawid re got: A vay,
qîza minî mezin Merab, ez ê wê bi
jinitî bidim te; lê tenê di oxra min
de dilawêr be û cengên XUDAN

[1] Serhezar.

bike! Ji ber ku Saûl digot: Bila li hember wî ne destê min, lê belê destê Filistiyan hebe. 18 Û Dawid ji Saûl re got: Ez kî me û jiyana min û li Îsraêlê eşîra bavê min çî ye ku ez bibim zavayê qiral? 19 Û wusa bû ku, di dema ku Meraba qîza Saûl dê bidana Dawid, qîzê bi jinitî dan Adrîalê Mehola yî. 20 Û Mîkala qîza Saûl ji Dawid hez dikir û gîhandin Saûl û ev bi çavê wî ve xweş xuyanî bû. 21 Û Saûl: Bila bona ku jê re bibe dafik û bila destê Filistiyan li dijî wî be, ez Mîkal bidim wî digot. Û Saûl ji Dawid re got: Tuyê îroj, cara duwemîn bibe zavê min.
22 Û Saûl emir da qûlên xwe: Bi dizîka bi Dawid re biaxifin û jê re bibêjin: A vay, qiral ji te hez dike û hemû qûlên wî ji te hez dikin û bibe zavê qiral. 23 Û qûlên Saûl, van gotinan ji Dawid re gotin. Û Dawid got: Ma di vê feqîrî û bêrêziya min de, ji qiral re zava bûyîn qey ji çavên we re tiştekî sivik tête xuyakirin? 24 Û qûlên Saûl bi gotina: Dawid wusa got gîhandin wî. 25 Û Saûl got: Hûn ê ji Dawid re wusa bibêjin: Qiral giraniyê naxwaze; lê tenê, bona ku ji neyarên xwe re tolê hilde, sed gûlfeyê Filistiyan dixwaze. Û Saûl li gor ku dê Dawid bi destê Filistiyan ve bixîne fikirî bû. 26 Û qûlên Saûl van gotinan gîhandin Dawid û zavabûna qiral, ji çavê Dawid re xweş xwuyanî bû. Û roj tijî nebûbûn 27 û Dawid rabû û bi zilamên xwe re çû û ji nava Filistiyan li du sed kesî xistin û Dawid, bona ku bibe zavayê qiral, gulfeyên wan anî û wan tam bi jimartina wan ve da qiral. 28 Û Saûl dît û fêhm kir ku XUDAN bi Dawid re ye û qîza Saûl Mîkal, ji wî hez dikir. 29 Û Saûl, êdî bi zêdeyî ji Dawid ve tirsiya û Saûl di hemû rojan de bû neyarê Dawid.
30 Û serokên Filistiyan derketin û ew her çend caran derketibin, Dawid ji hemû zilamên Saûl baqilî kir û navê wî zehf biqîmet bû.

*Saûl pêşniyara kuştina Dawid dike*

19 Û Saûl ji lawê xwe Yonatan re û ji hemû qûlên xwe re, bona kuştina Dawid got. Û Yonatanê lawê Saûl zehf ji Dawid ve hez dikir. 2 Û Yonatan gîhand Dawid û got: Bavê min Saûl, bona ku te bukuje dixebite û niha ez rica dikim, sibehê xwe biparêze û li cîhekî bi dizî rûne û xwe veşêre 3 û ez ê derkevim û li beyara ku te xwe veşartiye, ez ê li cem bavê xwe bisekinim û ez ê di derheqê te de bi bavê xwe re biaxifim û ger ez tiştekî bibînim, ez ê bighînim te.
4 Û Yonatan, bi bavê xwe Saûl re, di derheqê Dawid de, bi qenciyê axifî û jê re got: Bila qiral ji qûlê xwe re, li dijî Dawid sûcê meke; ji ber ku ew li dijî te sûc nekir û hemû

karên wî, bona te zehf qenc bûne;
5 û canê xwe girt nav lepên xwe
û li yê Filistî xist û XUDAN bona
hemûya Îsraêl xelasiya mezin çê-
kir; te dît û tu kêfxweş bû û li cîhê
vala bi kuştina Dawid, çima tuyê
li dijî xwîna bê sûc sûcê bikî? 6 Û
Saûl gotina Yonatan guhdarî kir
û Saûl bi gotina: Bona heqê XU-
DANê ku zindî ye, dê neyê kuştin!
sondê da. 7 Û Yonatan bangî Da-
wid kir û Yonatan hemûyên van
gotinan gîhandin wî. Û Yonatan
Dawid anî cem Saûl û ew dîsa
mîna berê kete xizmeta qiral.
8 Û carekî din ceng bû û Dawid
derket û li dijî Filistiyan cengê kir
û bi derbekî mezin li wan xist û
ji ber wî reviyan. 9 Û Saûl, gava
rima wî di destê wî de li malê
rûniştîbû, ji aliyê XUDAN ve ru-
hekî xerab, bi ser wî ve daket û
Dawid bi destê xwe ve li çenkê
dixist. 10 Û Saûl, bona ku bi rimê
Dawid li dîwêr ve bukute xebitî,
lê Dawid xwe ji ber Saûl ve da alî
û rim bi dîwêr ve çikiya û Dawid
reviya û wê şevê xelas bû. 11 Û
Saûl bona ku li benda Dawid be
û sibehê wî bukuje, şandiyan şand
mala wî û jina Dawid Mîkal, jê re
gîhand û got: Ger tu îşev canê xwe
xelas nekî, tuyê sibehê bête kuştin.
12 Û Mîkal, Dawid ji şivakê ve
daxist û ew çû, reviya û xelas bû.
13 Û Mîkal terafîmê rahişt û xist
nava livînan û bahlîfa ji mûyê bi-
zinan e danî serserê wê û bi lihêfê
ve nuxumand. 14 Û Saûl, bona
ku Dawid bigirin şandiyan şand
û pîrekê got: Ew nexweş e! 15 Û
Saûl, bi gotina: Wî di nava livînan
de bînin cem min ku ez bukujim
bona dîtina Dawid, şandiyan şand.
16 Û şandî ketin hundir û a vay,
terafîm di nava nivînê de û bahlîfa
ji mûyê nêriyan jî li ber serê wî bû.
17 Û Saûl ji Mîkal re got: Çima te
ez xapandim û neyarê min şand û
ew xelas bû? Û Mîkal bersivê da
Saûl: Dawid ji min re got: Min
berde; ma çima ez ê te bikujim?
18 Û Dawid reviya û xelas bû û hate
Rama, cem Samûyêl û her tiştên
ku Saûl pê kirine, jê re got. Û tevî
Samûyêl çûn û li Nayotê rûniştin.
19 Û ji Saûl re gîhandin û gotin: A
vay, Dawid li Nayota Ramayê ye.
20 Û Saûl bona ku Dawid rahêjin,
şandiyan şand û gava şandiyên
Saûl dîtin ku civata peyxamberan
peyxambertiyê dikin û Samûyêl jî
bi serîtî li ser wan disekine, Ruhê
Xwedê hate ser wan jî û wan jî pey-
xambertiyê kirin. 21 Û gava ji Saûl
re gîhandin, wî şandiyên wekî din
şand û wan jî peyxambertiyê kirin.
Û Saûl cara sêwemîn dîsa şandiyan
şand û wan jî peyxambertiyê kirin.
22 Li ser vêya, ew bi xwe jî çû Ra-
mayê û hate ser bîra mezin a ku li
Sekûyê yî û pirsiya û got: Samûyêl
û Dawid li ku ne? Û zilamek got: A
vay, li Nayota ku di Ramayê de yî

ne. 23 Û çû wir, Nayota li Ramayê
yî û Ruhê Xwedê hate ser wî jî û
heta ku gîhaşt Nayota li Ramayê
yî bi peyxambertî kirinê ve diçû.
24 Û wî jî kincên xwe derxist û li
hember Samûyêl peyxambertiyê
kir. Di hemû rojê û hemûya şevê
de bê qeftan raza. Gotina gel ya ku
dibêjin: Ma qey Saûl jî di nava pey-
xamberan de ye? ji ber vê yekê ye.

*Hevalbendiya Dawid û Yonatan*

20 Û Dawid ji Nayota ku li Ra-
mayê yî reviya û hat û li ber
Yonatan got: Ma min çi kir? Fesa-
diya min çî ye? Û li dijî bavê te sûcê
min çî ye ku li canê min digerî?
2 Û wî jê re got: Bila dûr be! tuyê
nemire; a vay, dixwaze bila karê
mezin be, an jî karê biçûk be, bavê
min, berî ku bi min re neşêwire,
tiştekî nake û ma dê çima bavê min
ev tiştî ji min veşêre? Ne wusa ye.
3 Û Dawid jî sondê da û got: Bavê
te qenc pê dizane ku di çavê te de
xêrê dîtime û dibêje: Bila Yonatan
bi vêya nizanibe, ya na dê bikesire.
Lê belê bona heqê XUDANê ku bi
rastî zindî ye, di navbera min û mi-
rinê de, tenê gavek heye! 4 Û Yo-
natan ji Dawid re got: Canê te her
çi bixwaze, ez ê bona te wê bikim!
5 Û Dawid ji Yonatan re got: A
vay, sibê serê mehê ye û muheqeq
divê ez bi qiral re rûnim xwarinê;
lê belê min bişîne û heta êvara roja
sêwem ez li beyarê xwe veşêrim.
6 Ger bavê te li min bigere, wê
gavê bibêje: Dawid, bona ku berbi
bajarê xwe, Beytlehemê ve biçe,
destûrê ji min ve xwest; ji ber ku li
wir, qurbana salê ya hemûya eşîrê
heye. 7 Ger: Zehf qenc e bibêjî,
ji qûlê te re selamet e; lê belê ger
hêrs bibe, bizanibe ku ji aliyê wî
ve, qirara xerabiyê hatiye dayîn.
8 Ji ber vê yekê xêrê ji qûlê xwe
re bike; ji ber ku te qûlê xwe, bi
xwe re xist peymana XUDAN!
Lê belê, ger di min de fesadî hebe,
tu min bukuje; ji ber ku, ma tuyê
çima min ji bavê xwe re bibî? 9 Û
Yonatan got: Bila ji te dûr bibe!
ji ber, ger bizanibûma ku ji aliyê
bavê min ve bona te bi xerabiyê ve
biryar hatiye dayîn, ma min ê ew
ê ji te re negotiba? 10 Û Dawid ji
Yonatan re got: Ger bavê te bersiva
bi tûndî bide min, dê kî ji min re
bibêje? 11 Û Yonatan ji Dawid re
got: Were ku em hilkişin beyarê. Û
her du jî hilkişiyan beyarê.
12 Û Yonatan ji Dawid re got:
Bila Xwedayê Îsraêl XUDAN
şahde be; sibê an jî roja din di van
wextan de, dema ez devê bavê
xwe bigerim, a vay, ger ji Dawid
re qencî hebe, ma wê gavê ez ê ji
te re neşînim û venekim? 13 Ger
bi te re xerabî kirin, bi bavê min
ve qenc xuyanî bibe û ez vêya
ji te re venekim û bona ku tu bi
xweşiyê ve here ji te re nebêjim,
bila XUDAN bi Yonatan ve wusa

û zêdetir jî bike! Û XUDAN ger
çawa bi bavê min re bû, bila bi te
re jî be. 14 Û xêra XUDAN, bona
ku ez nemirim an jî di jiyana min
de tuyê nîşanî min nede; 15 lê belê
tuyê xêra xwe jî abadîn ji mala
min re jî nebire, dema XUDAN,
hemû neyarên Dawid ji rûyê erdê
ve avêtin jî tuyê nebire! 16 Û
Yonatan bi mala Dawid re sondê
da û got: Bila XUDAN ji destên
neyarên Dawid ve bixwaze!

17 Û Yonatan ji ber hez kirina xwe
ya ji Dawid re, carekê din sondê
bi wî re da xwarin; ji ber ku mîna
canê xwe jê hez dikir. 18 Û Yona-
tan jê re got: Sibê serê mehê ye û
dê li te bête gerîn, ji ber ku dê cîhê
te vala be. 19 Û paşî ku sê roj ma,
tuyê zû dakeve û tuyê were cîhê ku
roja ew kar çêbû, te xwe veşartîbû
û tuyê li ber kevirê Destpêkê ve
rûne. 20 Û ez, mîna ku ez bavêjim
nîşanekê, ez ê sê tîrî bavêjim cem
wê. 21 Û a vay, bi gotina: Here,
tîran bibîne! ez ê xulam bişînim.
Ger ji xulam re: A vay, tîr ji te
pêştir in, wan rahêle! bibêjim, tu
were; ji ber ku bona te xweşiye û
bona mafê XUDANê ku zindî ye
tiştek nîne. 22 Lê belê ger ji xulam
re: A vay, tîr ji te paştir in! bibêjim,
di rêya xwe de here; ji ber ku XU-
DAN te şandiye. 23 Gava em bên
tiştê ku ez û tu, me di nav hev de
axifîne, a vay, her tim XUDAN di
navbera min û te de ye.
24 Û Dawid xwe li beyarê veşart
û gava bû serê mehê qiral li xwa-
rinê ve rûnişt. 25 Û qiral li cîhê
xwe, mîna carên berê li cîhê ku li
ber dîwar e rûnişt û Yonatan rabû
ser pêlan û Abner li cem Saûl ve
rûnişt; lê belê cîhê Dawid vala bû.
26 Û Saûl wê rojê tiştekî negot;
ji ber ku got: Tiştek hatiye serê
wî, ne paqij î, muheqeq ne paqij
î! 27 Û dotira rojê, di roja duwem
ya mehê de, cîhê Dawid vala bû û
Saûl ji lawê xwe Yonatan re got:
Gelo çima lawê Îşay doh jî, îroj
jî nehat xwarinê? 28 Û Yonatan
bersivê da Saûl: Dawid, bona ku
here Beytlehemê bi heterî destûrê
ji min xwest; 29 û got: Ez rica di-
kim, min bişîne; ji ber ku li bajêr,
qurbana eşîra me heye û li wir
bûyînê, birayê min ji min re emir
kir û niha, ger di çavê te de xêrê
dîtibim, ez rica dikim, ez herim
û birayên xwe bibînim. Ji ber vê
yekê nehat sifra qiral.

30 Û li dijî Yonatan, hêrsa Saûl
sor bû û jê re got: Ya lawê pîreka
rêşaş û asê! ma qey ez nizanim
tu bona şermezariya xwe û bona
şermezariya tazîbûna diya xwe
te lawê Îşay, ji xwe re bijartiye?
31 Ji ber, heta ku lawê Îşay li rûyê
erdê bijî, ne tuyê li cîhê xwe bise-
kinî û ne jî dê qiraletiya te. Niha
bişîne û wî bîne cem min, ji ber
ku divê ew bimire! 32 Û Yona-
tan bersivê da bavê xwe Saûl û jê

re got: Ma dê çima bête kuştin?
Wî çi kiriye? 33 Û Saûl bona ku
lêxe, rima xwe avêt wî û Yonatan
fêhm kir ku ji aliyê bavê wî ve,
bona kuştina Dawid biryar hatiye
dayîn. 34 Û Yonatan, bi hêrsa sor
ve ji sifrê rabû û di roja duwem ya
mehê de xwarinê nexwar; ji ber,
bona Dawid bi keser bû, ji ber ku
bavê wî, ew şermezar kiribû.
35 Û Yonatan, di dema ku bi Da-
wid re bijartibû de, sibehê derket
beyarê û li cem wî xulamekî biçûk
hebû. 36 Û ji xulamê xwe re got:
Bazde, niha tîrên ku ez ê bavêjim
bibîne! Û gava xulam baz dida,
Yonatan jê wêdetir tîrekê avêt.
37 Û gava xulam gîhaşt cem tîra
ku Yonatan avêtiye, Yonatan li
pêy xulam bang kir û got: Ma tîr
ji te paştir nîne! 38 Û Yonatan ji
paş xulam re bang kir û got: De
bilezîne, bazde, mesekine! Û xu-
lamê Yonatan tîran da hev û anî
cem efendiyê xwe. 39 Û xulam
tiştekî fêhm nekir; tenê Dawid
û Yonatan bi kar ve dizanîbûn.
40 Û Yonatan çekên xwe da xu-
lamê xwe û jê re got: Here, vana
bibe bajêr! 41 Û gava xulam çû,
Dawid ji aliyê başûr ve rabû û bi
dev û rû xwe avêt erdê û sê carî
xwar bû; hev û din ramûsandin û
pev re giriyan; hela Dawid, ew bi
xwe zêdetir giriya. 42 Û Yonatan
ji Dawid re got: Bi xweşiyê ve
here! ji ber ku em her du bi gotina:
Di nava min û te de û di nava nî-
jada te û nîjada min de dê abadîn
XUDAN hebe! bi navê XUDAN
ve sondê xwarin. Û Dawid rabû û
çû; Yonatan jî kete bajêr.

*Dawid ji Saûl ve direve*

21 Û Dawid hate Nobê, cem
kahîn Ahîmelek û Ahî-
melek bi lerizandinê pêrgîniya
Dawid kir û jê re got: Ma gelo
çima tu tenê yî û tu kes li cem te
nîne? 2 Û Dawid, ji kahîn Ahî-
melek re got: Qiral bona karekî
emir da min û ji min re got: Bila
bona karê ku ez te dişînim û ji te
re emir kirime tu kes tiştekî nizanî
be û xulaman bi filan filan cîhî ve
wezîfedar kirim! 3 Û niha, li cem
te çi heye? Pênc nanî, an jî çi hebe
bide destê min. 4 Û kahîn bersivê
da Dawid û got: Zêde nan li cem
min nîne, lê belê ger xulaman
xwe ji pîrekan ve parastibin, nanê
pîroz heye! 5 Û Dawid bersivê da
kahîn û jê re got: Bi rastî, sê roj e
ku, em ji pîrekan ve dûr mayîne;
dema ez derketim, ku ev bi xwe
rêwîtiyek bêrêz bûba jî, kîsên xu-
laman hatibûn pîroz kirin; îro dê
kîsên wan hîn çiqasî bi zêdeyî
pîroz bin. 6 Û kahîn nanê pîroz da
wî; ji ber ku xeynî nanê aramiyê,
yê ku dema di roja ji ber XUDAN
de tête rahiştin bona nanê germ
deynin cîhê wî, wî hiltînin, li wir
nan tunebû.

7 Û yek ji qûlên Saûl, ew roj li
wê derê bû; li ber XUDAN hatibû
girtin û navê wî Doegê Edomî bû
û serekê şivanên Saûl bû. 8 Û Da-
wid ji Ahîmelek re got: Ma li ev
derê, li cem te şûrek an jî rimek
nîne? Bona, ji ber ku karên qi-
ral bilezî bûn, ne şûrê xwe û ne
jî çekên xwe hilgirtim cem xwe.
9 Û kahîn got: Şûrê Golyatê Fi-
listî, yê ku te di geliya Elayê
de lêxistibû, a vay, bi wê cawê
pêçayî, li paş efodê ye; ger tuyê
wê rahêjî, rahêje; ji ber ku li vir
xeynî wê nîne. Û Dawid got: Yekî
mîna wê nîne, wê bide min!
10 Û Dawid rabû û wê rojê ji ber
Saûl ve reviya û çû cem Akîşê qi-
ralê Gatê. 11 Û qûlên Akîş jê re
gotin: Ma qiralê welêt ne ev Da-
wida ye? Ma di reqsan de ji hev û
din re, bi gotina:
Saûl li hezarên wan xistin,
Dawid jî li deh hezarên wan,
ji hev re sitran gotina wan ne di
derheqê viya de yî? 12 Û Dawid
van gotinan xist dilê xwe û zehf ji
Akîşê qiralê Gatê ve tirsiya. 13 Û
li ber wan rewşa xwe guhert û di
destên wan de xwe bi dînikî dida
xuyakirin û deriyan qerempûşk
dikirin û şorika xwe bi riya xwe
ve diherikand. 14 Û Akîş ji qûlên
xwe re got: A vay, hûn dibînin ku
zilam dîn e; ma çima we wî anîn
cem min? 15 Ma tu motajiya min
ji dîna re heye ku we wî anîn ber
min ku bona dînitiyê bike? Ma ev
dikare bikeve mala min?

*Dawid di şikefta Adûlamê de*

1.Dîr 11,15-19; Zeb 57; 142

22 Û Dawid, ji wir ve derket
rê û di şikefta Adûlamê de
xwe sitirand û dema birayên wî û
hemû maliyên bavê wî bihîstin,
daketin wê derê, cem wî. 2 Û her
kesên ku di tengasiyê de ne û her
kesên ku deyndar in û her kesên
ku canên wan şewitîne li cem wî
civiyan û ew li ser wan bû serok û
li cem wî, qasî çar sed kesî hebûn.
3 Û Dawid, ji wir çû Mîtspeya
Moabê û ji qiralê Moabê re got:
Ez rica dikim, heta ku ez bizani-
bim ka dê Xwedê çi bi min bike,
bila dayik û bavê min derkevin û
li cem we bimînin. 4 Û wan anîn
ber qiralê Moabê û di hemû ro-
jên ku Dawid li bircê bû, li cem
wî rûniştin. 5 Û Gad peyxamber
ji Dawid re got: Li bircê rûnenê,
here û bikeve welatê Cihûda. Û
Dawid çû û ket daristana Heretê.

*Saûl Kahînên Bajarê Nobê dikuje*

6 Û Saûl bihîst ku Dawid û zilamên
li cem in, hatine dîtin û Saûl li
Gîbeayê rûdinişt, di bin dara kiferi-
yê ya ku li Ramayê ye bû û rima wî
di destê wî de bû û hemû qûlên wî li
dora wî bûn. 7 Û Saûl ji qûlên xwe
ên ku li dora wî sekinîne re got: Ya
Benyamînî, niha guhdarî bikin! ma

dê qey lawê Îşay rez û zeviyan bide
we, dê we hemûyan bike fermandar
û serpêl, ku 8 hûn hemû, we li dijî
min dek û dolaban[1] ava kirin û gava
lawê min, bi lawê Îşay re sondê da,
kesî ku guhê min veke[2] çênebû?
9 Û Doegê Edomî bersivê dayê, ew
jî li cem qûlên Saûl ve sekinîbû û
got: Ez bi xwe dîtim ku lawê Îşay
hate Nobê, cem Ahîmelekê lawê
Ahîtûb. 10 Û bona wî ji XUDAN
re pirsî û zewêde da wî û şûrê
Golyatê Filistî jî da wî.

11 Û qiral, bona ku bangî Ahîme-
lekê lawê Ahîtûb û hemû maliyên
bavê wî û kahînên ku li Nobê ne
bikin, zilam şand û hemû hatin
cem qiral. 12 Û Saûl got: Ya lawê
Ahîtûb, niha guhdarî bike! Û got:
A vay ez, efendiyê min! 13 Û Saûl
jê re got: Mîna ku îro dibe bona ku
li dijî min serî hilde, kemînê ji min
re bavêje, bi nan û şûr dayînê û
bona wî ji Xwedê ve pirsînê, çima
te û lawê Îşay li dijî min pergalê
ava kirin? 14 Û Ahîmelek bersivê
da qiral û got: Ma di nav qûlên te
de ên ku wekî Dawid in, ê ku zavê
qiral e, ê hatine girtin civaka şêwrê
û yê ku di mala te de birêz e, dil-
soz e kî ye? 15 Ma qey îroj, dest
bi bona wî ji Xwedê pirsînê kiri-
me? Bila ji min ve dûr be; bila
qiral sûcê nevêje ser vî qûlê xwe,
ser hemû maliyên bavê min; ji ber
ku dixwaze bila biçûk be, dixwa-
ze mezin be, ev qûlê te ji vî karî,
bi tiştekî nizane! 16 Û qiral got:
Ya Ahîmelek; tu û hemû maliyên
bavên te, hûn ê muheqeq bimirin!
17 Û qiral, ji leşkerên revok, yên ku
li cem wî disekinîn re got: Vege-
rin û kahînên XUDAN bukujin, ji
ber ku wan jî bi Dawid re yekdestî
kirin, ji ber ku bi revandina wî fêr
bûn, lê belê guhê min venekirin.
Lê belê qûlên qiral, nexwestin ku
bona lêxistina kahînên XUDAN
destên xwe dirêj bikin. 18 Û qiral ji
Doeg re got: Tu vegere û li kahîn-
an bixe! Û Doegê Edomî vegeriya
û li kahînan xist û wê rojê heyştê û
pênc kesên ku efoda kitanî li xwe
kiribûn kuşt. 19 Û Noba ku bajarê
kahînan e, ji ber şûrê xwe ve der-
bas kir, ji zilaman heta pîrekan, ji
zarokan heta yên ku hîn şîr dimêjin
û ganêran û keran û mîhan jî ji şûr
ve derbas kirin.

20 Û ji lawên Ahîmelekê lawê
Ahîtûb, yekî bi navê Abîatar xe-
las bû û li pêy Dawid reviya.
21 Û Abîatar ji Dawid re gîhand
ku, Saûl kahînên XUDAN kuştine.
22 Û Dawid ji Abîatar re got: Ma-
dem ku Doegê Edomî li wir bû,
min wê rojê fêhm kir ku dê mu-
heqeq bighîne Saûl; ez bûm sede-
ma kuştina hemû maliyên bavê te.
23 Li cem min bimîne, metirse; ji

---

1 An jî: Fenekiyan.

2 An jî: Kesî ku min jê haydar bike nebû.

ber, ê ku li canê min digere, li canê
te jî digere; ji ber ku tuyê li cem
min di ewledariyê de be.

*Dawid Bajarê Keîlayê xelas dike*

23 Û gîhandin Dawid û gotin:
A vay, Filistî, li hember
Keîlayê cengê dikin û bênderan
talan dikin. 2 Û Dawid bi gotina:
Gelo ez herim û li van Filistiyan
bixim? ji XUDAN pirsî. Û XU-
DAN ji Dawid re got: Here, li Fi-
listiyan bixe û Keîlayê xelas bike.
3 Û zilamên Dawid jê re gotin: A
vay li vir, li Cihûdayê em ditirsin;
çawa em herin Keîlayê, hember
rêzê Filistiyan? 4 Û Dawid carekî
din ji XUDAN ve pirsî. Û XU-
DAN bersivê da wî û got: Rabe,
dakeve Keîlayê; ji ber ku ez ê Fi-
listiyan bidim destên te. 5 Û Da-
wid û zilamên xwe çûn Keîlayê û
li hember Filistiyan cengê kirin û
heywanên wan ajotin û bi lêxisti-
nekî mezin li wan xistin. Û Dawid,
gelê Keîlayê xelas kir. 6 Û wusa
bû ku, dema Abîatarê lawê Ahî-
melek reviya Keîlayê, cem Dawid,
bi efoda di destê xwe de daket.

*Saûl bera pêy Dawid dide*

7 Û dema Dawid hate Keîlayê,
ji Saûl re hate gotin. Û Saûl got:
Xwedê wî da destê min; ji ber ku
bi ketina bajarekî bi derî û zen-
dên wê hene ve, wî xwe heps kir[1].
8 Û Saûl bona ku dakeve Keîlayê
û dora Dawid û zilamên wî bigi-
re, hemûya netewê bangî cengê
kir. 9 Û Dawid dizanîbû ku Saûl
li dijî wî xerabiyê difikire û ji
kahîn Abîatar re got: Efodê bîne
vir! 10 Û Dawid got: Ya Xwedayê
Îsraêl XUDAN, ev qûlê te mu-
heqeq bihîst, bona ku ji ber min
bajêr helaq bike, Saûl bona hati-
na Keîlayê dixebite. 11 Û gelo dê
zilamên Keîlayê min bidin destên
wî? Gelo Saûl, mîna ku qûlê te
bihîstiye, dê dakevî? Ya Xwedayê
Îsraêl XUDAN, ez lava dikim, ji
vî qûlê xwe re bibêje! Û XUDAN
got: Dê dakevî! 12 Û Dawid got:
Gelo dê zilamên Keîlayê; min û
zilamên min bidin destê Saûl? Û
XUDAN got: Dê bidin! 13 Û Da-
wid û zilamên wî, qasî şeş sed kesî
bûn, rabûn û ji Keîlayê derketin û
çûn cîhê ku heta karibin herin. Û
ji Keîlayê xelas bûna Dawid, ji
Saûl re hate gotin, ew jî dev ji der-
ketinê berda. 14 Û Dawid di çolê,
di bircan de rûnişt û di çiyayiya li
çola Zîfêyî de ma. Û Saûl her roj
lê digeriya, lê belê Xwedê Dawid
neda destê wî.
15 Û Dawid dît ku Saûl bona li
canê wî bigere derket û Dawid
li daristana li çola Zîfê bû. 16 Û
Yonatanê lawê Saûl rabû û çû da-
ristanê, cem Dawid û destê wî, bi
Xwedê ve xwurttir kir. 17 Û jê re

[1] An jî: Ew hate girtin.

got: Metirse! ji ber ku dê destê
bavê min Saûl nikaribe te bibîne
û tuyê li ser Îsraêlê ve bibe qiral
û ez ê ji te re bibim yê duwemîn;
bavê min Saûl jî bi vê yekê dizane.
18 Û her du jî, li ber XUDAN
sondê dan û Dawid li daristanê
ma û Yonatan çû mala xwe.
19 Û Zîfî hilkişiyan Gîbeayê cem
Saûl û gotin: Dawid li cem me
ye, ma di bircan de, di daristana
ku li gira Hakîlayê ya li başûrê
çolêyî de xwe venaşêrî? 20 Û li
gor canxwestina xwe yî daketinê,
ya qiral, niha dakeve; wî dayîna
destê qiral jî bi me dikeve. 21 Û
Saûl got: Hûn ji aliyê XUDAN
ve pîroz bin, ji ber ku heyfa we
li min hat! 22 Herin, ez rica dikim,
çêtir lêkolînê lê bikin û cîhê
ku lingê wî lê ye, ka kî li wir wî
dibîne fêhm bikin û bibînin; ji ber
ku ji min re dibêjin ku ew zehf bi
fenekiyê dike. 23 Hemû cîhê ku
xwe lê veşartiye bibînin û fêhm
bikin û dîsa bi agahiya rast ve werin
cem min, ez ê jî bi we re herim
û dê wusa bibe ku, ger ew li welêt
be, di nava hemû hezarên Cihûda
de ez ê lêkolînê li wî bikim!
24 Û rabûn û ji pêşiya Saûl ve
çûn Zîfê û Dawid û zilamên xwe
li Arabê[1], li başûra çolê, li çola
Maonê bûn. 25 Û Saûl û zilamên
wî, bona ku lê bigerin çûn. Û ji Dawid
re hate gîhandin û daket zinarê
û di çola Maonê de rûnişt. Û gava
Saûl vê yekê bihîst li çola Maonê
bera pêy Dawid da. 26 Û Saûl li
aliyekî çiyê û Dawid û zilamên
xwe jî, li aliyê dinî çiyê dimeşiyan
û Dawid, ji ber ku ji ber Saûl ve
bireve lez kir; ji ber ku Saûl û zilamên
xwe bona ku bi Dawid û zilamên
wî ve bigirin, dora wî girtin.
27 Û şandiyek hate cem Saûl û got:
Lez bike û were; ji ber ku Filistiyan
êrîşî welêt kirin! 28 Û Saûl ji
pêy beradana Dawid vegeriya û li
dijî Filistiyan çû; bo wê ji wir re
Sela-Hammahlekot[2] hate gotin.
29 Û Dawid ji wir derket û di
bircên En-Gedî de rûnişt.

*Dawid li canê Saûl dibexşîne*

24 Û wusa bû ku, dema Saûl ji
pêy Filistiyan vegeriya, jê
re, bi gotina: A vay, Dawid li çola
En-Gediyê ye hate agahî kirin. 2 Û
Saûl ji hemûya Îsraêlê ve sê hezar
zilamê bijartî rahişt û bona ku li ser
zinarên pezkoviyan li Dawid û zilamên
wî ve bigerin çû. 3 Û hate
hewşên mîhan ên ku li ser rê ne û
li wir şikeftek hebû û Saûl, bona
ku lingên xwe buxumîne, ket wir.
Û Dawid û zilamên xwe li aliyê
hundirê şikeftê de rûdiniştin. 4 Û
zilamên Dawid jê re gotin: A vay,
roja ku XUDAN ji te re: Ez ê neya-

---

*1* Newala kûr ya li bakur û başûrê çemê Lût e.

*2* Zinarê cûdayiyan.

rê te bidim destê te û tuyê tiştê ku
di çavê xwe de xweş tête xuyanî ki-
rin ji wî re bike gotiye, ev roj e. Û
Dawid rabû û bi dizîka dawa cibba
Saûl jê kir. 5 Û jê pêv wusa bû ku, ji
ber dawa Saûl jêkiriye, dilê Dawid,
wî xwe bi xwe re xerab dikir. 6 Û ji
zilamên xwe re got: Bila XUDAN
nîşanî min nede ku ez vî karî li dijî
efendiyê xwe, ji Mesîhê XUDAN
re bikim, ez dest dirêjî wî bikim,
ji ber ku ew Mesîhê XUDAN e!
7 Û Dawid bi van gotinan, kete
ber zilamên xwe û bona li ber Saûl
rabûnê nehişt. Û Saûl ji şikeftê ve
rabû û çû rêya xwe.
8 Û li pêy wî Dawid rabû û ji şikeftê
ve derket û li pêy Saûl ve, bi go-
tina: Efendiyê min, qiral! bang kir.
Û Saûl li pêy xwe nihêrt û wecê
Dawid bi erdê ve xwar bû û secde
kir. 9 Û Dawid ji Saûl re got: Ma
tu çima gotina zilamên ku dibêjin:
A vay, Dawid li xesara te digere!
guhdarî dikî? 10 A vay îroj, çavê te
dît ku îroj li şikeftê XUDAN çawa
te da destê min û bona ku te biku-
jim got; lê belê çavê min te parast
û gotim: Ez nikarim destê xwe li
dijî efendiyê xwe dirêj bikim; ji
ber ku Mesîhê XUDAN e! 11 Û
binêre, ya bav, belê, li dawa cib-
ba xwe ya ku di destê min de ye
binêre; ji daw jêkirina cibba te û
nekuştina min bizanibe û bibîne
ku, di destê min de xerabî û guneh
nîne û tu, bona ku canê min bistînî,
te nêçîra wê kir, lê dîsa jî li dijî te
sûc nekirim! 12 Di navbera min û
te de bila XUDAN daraziyê bide;
lê belê dê destê min li dijî te rane-
be! 13 Metheloka zilamên kevin;
mîna ku dibêjin: Ji xerabiyê ve
xerabî derdikeve dê destê min jî li
dijî te ranebe. 14 Ma qiralê Îsraêlê
li pêy kî derket? Tu bera li pêy kî
didî? Pêy kûçikek mirî, pêy kêçekî!
15 Û bila XUDAN bibe serwer û
bila di nava min û te de daraziyê
bide û binêre û bila doza min bibînî
û min ji destê te ve xelas bike!
16 Û wusa bû ku, dema Dawid
van gotinana ji Saûl re got û qe-
dand, Saûl got: Lawê min Dawid,
ma vêya dengê te ye? Û Saûl bi
dengekî bilind giriya. 17 Û ji Da-
wid re got: Tu hîn jî ji min salihtir
î; ji ber ku min bi xerabiyê da te,
lê belê te bi qenciyê li min vege-
rand. 18 Û îroj te da nîşan kirin ku
tu ji min re bi qenciyê dikî, ji ber
ku XUDAN min da destê te û te
min nekuşt. 19 Ji ber ku, ger zila-
mek neyarê xwe bibîne, ma wî bi
qenciyê ve dişîne rêya wî? Ji ber
vêya, bona karê ku te îroj kiriye
bila XUDAN bi qenciyê ve li te
vegerîne! 20 Û a vay, ez niha mu-
heqeq dizanim ku tuyê qiraletiyê
bikî û dê qiraletiya Îsraêlê di destê
de te bête sekinandin. 21 Niha ji
bo min bona heqê XUDAN son-
dê bide ku, tuyê li pêy min nîjada
min jê neke û navê min ji mala

bavê min ve raneke! 22 Û Da-
wid sondê ji Saûl re da. Û Saûl çû
mala xwe û Dawid û zilamên xwe
jî hilkişiyan bircê.

*Dawid, Nabal û Abîgaîl*

25 Û Samûyêl çû ser heqiya
xwe û hemûya Îsraêl bona
wî civiyan û li xwe xistin û wî li
Ramayê, di mala wî de binax ki-
rin. Û Dawid rabû û daket çola
Paranê.
2 Û li Maonê zilamek hebû û
karê wî li Karmelê bû û ev zilama
zehf mezin bû û sê hezar mîhên
wî û hezar bizinên wî hebûn û li
Karmelê, mîhên xwe dibirand.
3 Û navê vî zilamî Nabal û navê
pîreka wî Abîgaîl bû û ev pîreka
zehf bi fêhmkarî bû û nêrîna wê
zehf xweşik bû; lê zilam jî tûnd
û di karên xwe de xerab bû û ew
ji mala Kaleb bû. 4 Û Dawid ji
çolê ve bihîst ku Nabal mîhên
xwe dibirîne. 5 Û Dawid deh heb
xulam şand û Dawid ji xulaman
re got: Derkevin Karmelê û herin
cem Nabal û ji aliyê min ve sila-
vê lê bikin. 6 Û hûn ê jê re wusa
bibêjin: Tu her hebî û bila ji te re
xweşî û ji mala te re xweşî û ji
her kesên te re xweşî be! 7 Û niha
bihîstim ku li cem te hevringvan
hene; a vay, şivanên te li cem me
bûn û me wan şermezar nekirin û
di hemû rojên ku li Karmelê bûn
de, tu kêmasiya tiştekî nedîtin.
8 Ji xulamên xwe re bipirse û dê ji
te re bighînin û bila xulam di çavê
te de xêrê bibînin; ji ber ku em di
roja xweş de hatin; ez rica dikim
tiştê ku ji destê te tê, bide qûlên
xwe û lawê xwe Dawid!
9 Û xulamên Dawid hatin û bi
navê Dawid li gor hemû van go-
tinan ji Nabal re gotin û bêdeng
man. 10 Û Nabal bersivê da û ji
xulamên Dawid re got: Gelo Da-
wid kî dibe? Ma lawê Îşay dibe kî?
Di van rojan de gellek qûl hene ku
her yek ji efendiyên xwe ve dire-
vin. 11 Ma gelo ez nanê xwe, ava
xwe û goştên heywanên xwe ên
ku bona hevringvanên xwe ser jê
kirime, bigirim û bidim zilamekî
da ez nizanim ku ji ku derê ye?
12 Û xulamên Dawid zivirîn rêya
xwe û şunda vegeriyan û hatin,
li gor hemûya van gotinana jê re
gotin. 13 Û Dawid ji zilamên xwe
re: Bila her kes şûrên xwe hildin
ser xwe! got. Û her kes şûrên xwe
hilgirtin û Dawid jî şûrê xwe hil-
girt û qasî çar sed kesî li pêy Da-
wid derketin û du sed kes li cem
pertalan man.
14 Û yek ji xulaman, ji Abîgaîla
pîreka Nabal re gîhand û got: A
vay, bona ku silavê li efendiyê me
re bike, Dawid ji çolê ve xulaman
şandin û ew jî wan dapaltin. 15
Lê belê ew zilamana zehf qen-
ciyê bi me re kiribûn û em neha-
tibûn şermezar kirin, dema em li

beyarê bûn, hemû rojên ku em bi
wan re meşiyan, tu tiştê me kêm
nebûn; 16 dema me mîhan dajotin,
di hemû rojên ku em li cem wan
bûn de, bi şev û roj, bona me bûn
meterîs[1]. 17 Û niha binêre û ka
tuyê çi bikî bifikire; ji ber ku li dijî
efendiyê me, li dijî hemûya mala
wî, biryara xerabiyê hatiye dayîn;
ji ber wusa zilamek bêkêr e ku, kes
nikare gotinê jê re bike.
18 Li ser vêya Abîgaîl bi lezî
xwe rada û du sed nan û du he-
banên xemrê û pênc mîhên ku
hatine amade kirin û pênc olcek[2]
genimên hatine qelandin û sed
kulîçeyên mewîj[3] û du sed parî
hêjîrê hatine dewisandin rahiştin
û li keran bar kirin. 19 Û ji xu-
lamên xwe re got: Derbasî pêşiya
min bibin; a vay, ez li pêy we têm.
Lê belê ji mêrê xwe Nabal re ne-
got. 20 Û wusa bû ku, dema pîrek
li kerê siwar bûyî, ji aliyê çiyayî
girtî dadiket, a vay, li hember wê
Dawid û zilamên xwe dadiketin û
pîrek rastî wan hat. 21 Û Dawid
gotibû: Bi rastî, min hemû tiştên
wî zilamî ên li çolê ne, bela se-
dem parast û ji hemû tiştên wî, tu
tişt kêm nebûn û dêvla qenciyê, bi
xerabiyê li min vegerand. 22 Ger
heta sibehê ez ji zilamên wî ve
yekî bi saxî bihêlim, bila Xwedê
mîna vêya û jê zêdetir ji neyarên
Dawid re bike!
23 Û gava Abîgaîl Dawid dît, lez
kir û ji kerê daket û li ser wecê xwe
li ber Dawid ket erdê û secde kir.
24 Û xwe avêt lingên wî û got: Gu-
neh li ser min efendiyê min, bila li
ser min be! û berde, bila cariya te
ji te re bibêje û gotinên cariya xwe
guhdarî bike! 25 Ez rica dikim, ji
ber Nabal, ji ber vî zilamê bêkêr,
bila efendiyê min kulê nexe dilê
xwe; ji ber ku navê wî çawa be, ew
bi xwe jî wusa ye; navê wî Nabal
e[4] û di wî de ehmeqî heye û ez, ca-
riya te, xulamên ku efendiyê min
şandine nedîtime. 26 Û Niha efen-
diyê min, bona mafê XUDANê
ku zindî ye û bona mafê jiyana te,
madem ku XUDAN te ji rijandina
xwînê û bona xwe bi destê xwe
tolhildanê vegirt, niha yên li xerabi-
ya neyaran û efendiyê min digerin
bila bibin mîna Nabal! 27 Û niha
ev diyariya ku cariya te ji efendiyê
min re aniye, bila ji xulamên ku li
pêy efendiyê min dimeşin re bête
dayîn. 28 Ez rica dikim, li gunehê
cariya xwe biborîne; ji ber ku dê
muheqeq XUDAN ji efendiyê min
re xaniyekî ewledar çêbike, ji ber
ku efendiyê min cengên XUDAN
dike û dê di hemû rojên te de di te
de xerabî tune be. 29 Û çawa zilam

[1] An jî: Sîper.
[2] Li rasteka menan binêrin.
[3] An jî: Sed goşî tiriyê ku hatiye hişk kirinê.
[4] Ehmeq e.

bona ku bera te bide û li canê te bi-
gerî rabû, lê dê canê efendiyê min
li ber Xwedayê te XUDAN ve, bi
demeda jiyanê ve girêdayî bimîne
û dê canên neyarên te, mîna ku di
nava qûsikê de bavêje, dê bavêje.
30 Û dê wusa bibe ku dema XU-
DAN, li gor hemû qenciya ku di
derheqê te de gotiye li efendiyê min
bike û te li ser Îsraêlê bike serwer,
31 ne li cîhê vala rijandina xwînê,
ne jî ji bo efendiyê min, bona xwe
hildana tolê dê ji te re nebe keser
û ji efendiyê min re nebe jana dil.
Û gava XUDAN ji efendiyê min
re qenciyê bike, cariya xwe di bîra
xwe de bîne.
32 Û Dawid ji Abîgaîl re got: Bila
Xwedayê Îsraêlê XUDAN pîroz
be ku, îroj bona pêrgîniya min, te
şand! 33 û bila fêhmkariya te pîroz
be û tu pîroz be; ji rijandina xwînê
û îroj tola xwe bi destê xwe ve hil-
danê te min sekinand! 34 Û rastî,
bona mafê Xwedayê Îsraêl, XU-
DANê ku zindî ye min ji xerabî
kirina te sekinandiye, ger bona ku
pêrgîniya min bikî, te bi lezî neki-
ra û nehata, muheqeq dê heta tîrêjê
sibehê yek jî ji zilamên Nabal ve
nemana! 35 Û tiştên ku jê re anîne,
Dawid ji destê wê ve rahişt û jê re
got: Bi xweşiyê hilkişe mala xwe,
binêre, gotina te guhdarî kirim û te
bi qenciyê qebûl kirim!
36 Û Abîgaîl hate cem Nabal û a
vay, li mala wî ziyafet hebû, mîna
dawetek qiralekî. Û dilê Nabal di
hundirê wî de kêfxweş bû û ew bi
xwe zehf serxweş bû û heta tîrê-
ja sibê, pîrek dixwaze bila hindik
be, an jî bila pirr be, tiştekî jê re
negot. 37 Û sibehê wusa bû ku,
dema Nabal ji xemrê ve hişyar bû
jina wî van tiştan gîhand wî û di
hundirê wî de dilê wî mir û ew bi
xwe bû mîna kevirekî. 38 Û wusa
bû ku, paşî deh rojî XUDAN li
Nabal ve xist û mir.
39 Û dema Dawid mirina Nabal
bihîst, got: XUDANê ku doza
şermezariya min ya bi destê Na-
bal bû dît û qûlê xwe ji xerabi-
yê da sekinandin, bila pîroz be û
XUDAN xerabiya Nabal bi serê
wî ve vergerand! Û Dawid, bona
ku Abîgaîl ji xwe re bi jinitî bi-
gire, zilaman şand ku bila pê re
biaxifin. 40 Û qûlên Dawid hatin
Karmelê, cem Abîgaîl û pê re bi
gotina: Dawid, bona ku te ji xwe
re bike jin, me ji te re şand axifin.
41 Û pîrek rabû û bi ser wecê xwe
bi erdê ve xwar bû û got: A vay,
cariya te, bona ku lingên qûlên
efendiyê min bişon xizmetkar
e. 42 Û Abîgaîl bi lezî kir û tevî
pênc pîrekên ciwan ên ku li pêy
wê tên rabû û li kerê siwar bû û
şandiyên Dawid li pêy wê çûn û
bû jina wî.
43 Û Dawid ji Yîzreêlê Ahînoamê
jî girt û her du jî bûn jinên wî.
44 Û Saûl, qîza xwe Mîkal jina

Dawid, dabû Paltiyê lawê Laîşê Gallîmî.

*Dawid dîsa li canê Saûl dibexşîne*
1.Sam 23,19-28; 1.Sel 5,15

26 Û Zîfî hatin Gîbeayê, cem Saûl û gotin: Ma Dawid li gira Hakîla, ya ku li ber çolê ye xwe venaşêrî? 2 Û Saûl rabû û bona ku li çola Zîfê, li Dawid bigerin tevî xwe sê hezar kesên ji Îsraêlê ve hatine bijartin girt cem xwe û daket çola Zîfê. 3 Û Saûl li gira Hakîla, ya ku li ber çolê ye, li qeraxa rê, artêşgehê danî. Û Dawid li çolê rûdinişt û dît ku Saûl li pêy wî ketiye û hatiye çolê. 4 Û Dawid sîxuran[1] şand û bi rastî jî fêhm kir ku Saûl hatiye. 5 Û Dawid rabû û hate cîhê ku Saûl artêşgehê daniye û Dawid, cîhê ku Saûl û Abnerê lawê Ner lê radikevin dît û Saûl di hundirê artêşgeha erebeyan de radiket û netewe li dora wî konên xwe danîbûn.
6 Û Dawid bersivê da û ji Ahîmelekê Hîttî re û ji Abîşayê birayê Yoab û yê lawê Serûya re got: Ka kî yê bi min re dakeve cem Saûl, artêşgehê? Û Abîşay: Ez ê bi te re dakevim, got. 7 Û Dawid û Abîşay şevê gîhaştin cem netewê û a vay, Saûl di artêşgeha erebeyan de dirêj bûbû û radiket û rima wî, li ber serî bi erdê ve çikandî bû û Abner û netewe li dora wî raketîbûn. 8 Û Abîşay ji Dawid re got: Xwedê îro neyarê te da destê te û niha, bihêle ku ez bi derbekê, bi rimê wî li erdê ve bukutim û cara duwemîn ez li wî naxim! 9 Û Dawid ji Abîşay re got: Wî mekuje; ji ber ku ma dê kî destê xwe dirêjî Mesîhê XUDAN bike û bêsûc bimîne? 10 Û Dawid got: Bona mafê XUDANê ku zindî ye, dê XUDAN li wî bixe; an jî dê roja wî were û ew ê bimire; an jî dê dakeve cengê û helaq bibe! 11 Bila ji dest dirêj kirina Mesîhê XUDAN, XUDAN te biparêze û niha, ez rica dikim, rima li ber serê wî ye û metera ava wî rahêje ku em herin! 12 Û Dawid ji ber serê Saûl rimê û metera wî ya avê rahişt û çûn û kesî nedît û kesî hîn nebû û kesî hişyar nebû; ji ber ku hemû radiketin, ji ber ku ji aliyê XUDAN ve xewek giran ketibû ser wan.
13 Û Dawid derbasî hember bû û li dûr ve li serê çiyê sekinî; di navbera wan de gellek cudayî hebû 14 û Dawid ji netewê re û ji Abnerê lawê Ner re bi gotina: Ya Abner, ma tu bersivê nade? bang kir. Û Abner bersivê da û got: Ma tu kî ye ku bi qiral ve diqêre? 15 Û Dawid ji Abner re got: Ma tu ne egîdek e? Û li Îsraêl, mîna te kî heye? Ma çima te notirvaniyê ji efendiyê xwe re, ji qiral re nekir? Ji ber ku bona efendiyê te, qiral bikuje, ji netewê kesek hat. 16 Ev tiştê ku tu dike ne qenc

[1] Cesûs.

e. Bona XUDANê ku zindî ye,
hûn lawên mirinê ne, ji ber ku we
ji efendiyê xwe re, ji Mesîhê XU-
DAN re notirvaniyê nekirin. Û niha
binêre, ka rim û metera avê ên ku li
ber serê qiral bûn li ku ne?
17 Û Saûl dengê Dawid nas kir
û: Ma ev dengê te ye, lawê min
Dawid? got. Û Dawid got: Dengê
min e, efendiyê min qiral. 18 Û
got: Gelo çima efendiyê min wusa
bera pêy qûlê xwe dide, ma çi ki-
rime? Û di destê min de çi xerabî
heye? 19 Û niha ez rica dikim,
bila efendiyê min qiral, gotinên
qûlê xwe guhdarî bike. Ger yê
ku li dijî min te radike XUDAN
be, bila pêşkêşiyekê qebûl bike;
lê belê ger lawên zilam bin, bila
ew li ber XUDAN bi nalet bibin;
ji ber, bona ku para min di mêrasa
XUDAN de tune be, bi gotina:
Here û ji îlahên din re qûlitiyê
bike! îroj min qewirandin. 20 Û
niha, bila ji ber XUDAN, xwîna
min li dûr ve nekeve axê; ji ber
ku li çiyayan çawa nêçîra kevo-
kan dikin, qiralê Îsraêl jî bona li
kêçekî bigere wusa derket!
21 Û Saûl got: Min bi xwe sûcê kir,
vegere, lawê min Dawid, ji ber ku
îroj canê min di çavê te de bi rûmet
e, ez ê êdî xerabiyê bi te nekim; a
vay, bêaqilî kirim û gellekî xapi-
yam! 22 Û Dawid bersivê da û got:
A vay rim, ya qiral! Bila ji xulaman
yek were û wê rahêle. 23 Û dê XU-
DAN berdêla dilsozî û qenciya her
kesî bide; ji ber ku îroj XUDAN
te dabû destê min, lê dîsa jî ne-
xwestim ku destê xwe direjî Mesîhê
XUDAN bikim. 24 Û a vay, çawa
ku canê te îroj di çavê min de bi-
qîmet bû, bila canê min jî di çavê
XUDAN de wusa bi qîmet be û bila
min ji her tengasiyê ve xelas bike!
25 Û Saûl ji Dawid re got: Tu, lawê
min Dawid, tu pîroz be! Tuyê him
egîdî bikî û him jî muheqeq bi ser
bikeve! Û Dawid bi rêya xwe ve
çû, Saûl jî vegeriya cîhê xwe.

*Dawid di nav Filistiyan de*

27 Û Dawid di dilê xwe de
got: Êdî rojekê ez ê bi des-
tê Saûl ve helaq bibim; bona min
ji reva welatê Filistiyan qenctir
tiştek nîne û dê Saûl hêviya xwe
ji min û di sînorên Îsraêl de ji gera
min ve qut bike û ez ê ji destê wî
ve xelas bibim. 2 Û Dawid rabû
û tevî şeş sed kesên ku li ba ne,
derbasî cem Akîşê lawê Maokê
qiralê Gatê bûn. 3 Û Dawid, ew û
zilamên wî, her yek tevî maliyên
xwe, Dawid jî bi her du pîrekên
xwe, Ahînoama Yîzreêlî û Abî-
gaîla Karmelî ya jina Nabal re,
li Gatê li cem Akîş ve rûniştin. 4
Û reva Dawid ya Gatê gîhandin
Saûl û êdî carekî din lê negeriya.
5 Û Dawid ji Akîş re got: Ger
niha di çavê te de xêrê dîtibim,
bila di bajarekî beyarê de cîhekî

bidin min ku ez li wir rûnim û
ma çima dê ev qûlê te di bajarê
qiral de, li cem te rûne? 6 Û wê
rojê Akîş Zîklag da wî; ji ber vê
yekê, Zîklag heta niha bajarê qi-
ralên Cihûda ne. 7 Û hejmara ro-
jên ku Dawid li welatê Filistiyan
rûniştiye salek û çar mehe ne.
8 Û Dawid û zilamên xwe derke-
tin û êrîşî Geşûriyan û Gîrziyan û
Amalekiyan kirin; ji ber ku gava
diçûn Şûrê, heta welatê Misirê, ji
demên kevn ve ên rûniştîbûn ew
bûn. 9 Û Dawid li welêt xist û
ne jin, ne mêr, tu kesî sax nehişt
û mîhan û ganêran û keran û de-
veyan û kinc rahişt û bir û vegeri-
ya û hate cem Akîş. 10 Û Akîş bi
gotina: We îro êrîşî kî kirin? pirsî.
Û Dawid got: Me êrîşî başûrê
Cihûda û başûrê Yerahmeêyan
û başûrê Keniyan kirin. 11 Û bi
gotina, bona ku di derheqê me
de, bi gotina: Dawid wusa kir û
hemû rojên ku di welatê Filistiyan
de rûdinişt ûsila wî wusa bû aga-
hiyê nedin, Dawid ne zilam û ne
jî ji pîrekan tu kesî, bona ku bîne
Gatê bi saxî nehişt. 12 Û Akîş bi
gotina: Li cem netewa xwe Îsraêl
xwe bitûmî mekrûh kir; ji ber vê
yekê, dê her tim bibe qûlê min bi
Dawid ve ewle bû.

*Saûl bi ruhan ve dişêwire*

28 Û di wan rojan de wusa
bû ku; bona li dijî Îsraêl
cengê bikin, Filistiyan artêşa xwe
ji cengê re civandin. Û Akîş ji Da-
wid re got: Tevî zilamên xwe, tuyê
di artêşê de bi min re derkeve, bi
qencî bi vêya bizanibe. 2 Û Dawid
ji Akîş re got: Tuyê bibîne ku ka
qûlê te çi dike. Û Akîş ji Dawid
re got: Ez ê jî di hemû rojan de, te
bikim parazkirê serê xwe.
3 Û Samûyêl miribû û hemûya
Îsraêl bona wî şînê girtibûn û wî
li Ramayê, di bajarê wî de binax
kiribûn. Û Saûl cinvanan û nêrîn-
vanan ji welêt ve rakiribû. 4 Û
Filistî li hev civiyan û hatin û li
Şûnemê artêşgehê danîn û Saûl
hemûya Îsraêl civand û li Gîl-
boayê artêşgehê danîn. 5 Û gava
Saûl artêşgeha Filistiyan dît, tirsi-
ya û dilê wî zehf lerizî. 6 Û Saûl
ji XUDAN ve pirsî, lê belê XU-
DAN ne bi xewnan ne bi Ûrimê
ne jî bi peyxamberan re bersivê
neda wî. 7 Û Saûl ji qûlên xwe re
got: Bona min li pîrekek cinvan
ve bigerin û ez herim cem wê û
ji wê bipirsim. Û qûlên wî jê re
gotin: A vay, li En-Dorê pîrekek
cinvan heye.
8 Û Saûl qilafetê xwe guhert û
kincekî din li xwe kir û tevî du
zilamî çû û şevê hatin cem pîrekê
û got: Ez rica dikim, bona min bi
cin ve li remlê binêre û tiştê ku ez
ê ji te re bibêjim ji min re derxîne.
9 Û pîrek jê re got: A vay, ma tu bi
kirina Saûl dizanî, çawa cinvanan

û remildaran ji welêt ve avêtine
dizanî û çima bona kuştina min,
ji canê min re dafikê datînî? 10 Û
Saûl ji pîrekê re, bi gotina: Bona
mafê XUDANê ku zindî ye, dê ji
vî karî ve tu xerabî ji te re neyê
bo mafê XUDAN sondê xwar.
11 Û pîrekê got: Ma ez kî ji te
re derxînim? Û Saûl: Ji min re
Samûyêl derxîne! got. 12 Û gava
pîrek Samûyêl dît, bi dengekî bi-
lind qêriya û pîrek, bi gotina: Ma
tu Saûl î, çima te min xapand? ji
Saûl re got. 13 Û qiral jê re got:
Metirse, lê belê tu çi dibînî? Û
pîrekê ji Saûl re got: Ez îlahek ji
erdê ve derdikeve dibînim. 14 Û
got: Zilamekî kalepîr bûyî derdi-
keve û cubekê li xwe pêçaye. Û
Saûl fêhm kir ku ew Samûyêl e û
bi dev û rû bi erdê ve xwar bû.
15 Û Samûyêl ji Saûl re got: Ma
çima te bi derxistina min aramiya
min xera kir? Û Saûl got: Ez zehf
di tengasiyê de me; ji ber ku Filistî
li dijî min cengê dikin û Xwedê ji
min ve cuda bûye û êdî ne bi pey-
xamber ve, ne jî bi xewnan ve ber-
sivê dide min û bona ku tu ka ez
çi bikim ji min re bibêjî, bangî te
kirim. 16 Û Samûyêl got: Madem
ku XUDAN ji te ve cuda bûye û
ji te re neyar bûye, wê gavê çima
tu ji min dipirsî? 17 Û XUDAN
mîna ku bi navdîtiya min ve gotibû
kir û XUDAN qiraletiyê ji destê te
veqetand û wê da cîranê te, da Da-
wid. 18 Ji ber ku te gotina XUDAN
guhdarî nekiriye û hêrsa wî ya sor
ji Amalekiyan re nekiriye, îroj XU-
DAN ev yekê ji te re kir. 19 Û dê
XUDAN Îsraêl jî tevî te bide destê
Filistiyan û sibê tu û lawên te, hûn
ê bi min re bin û artêşa Îsraêl jî dê
XUDAN bide destê Filistiyan.
20 Û Saûl hema bi qamî kete erdê
û ji ber gotinên Samûyêl ve zehf
tirsiya û di wî de hîlet jî tune bû;
ji ber ku di hemûya roj û hemûya
şevê de nan nexwaribû. 21 Û pîrek
hate cem Saûl û gava dît ku ew pirr
şaş bûye, jê re got: A vay, cariya te
gotina te guhdarî kir û canê xwe
xistim nav lepên xwe û gotinên ku
tuyê ji min re bibêje guhdarî kirim.
22 Û niha, ez rica dikim, tu jî gotina
cariya xwe guhdarî bike û pariyek
nan deynim ber te û bixwe û gava
tu biçî rêya xwe, bila ji te re bibe
quwet. 23 Lê belê wî nan nexwest
û got: Ez naxwim! Lê belê gava
qûlên wî, tevî pîrekê zorê dan wî
gotina wan guhdarî kir. Û ji erdê
ve rabû û li ser livînan ve rûnişt.
24 Û li mala pîrekê, golikek wê yî
qelew hebû û bi lezî wê serjê kir û
arvan rahişt û sitirand û ji vê, pî-
deyên bêhavên çêkir 25 û anî ber
Saûl û ber qûlên wî û xwarin. Û
wê şevê rabûn û çûn.

*Akîş Dawid dişîne Zîklagê*

29 Û Filistiyan hemû artêşên
xwe li Afekê civandin û

Îsraêlî li ber çavkaniya ku li Yîzreêlê yî, artêşgeha xwe ava kirin.
2 Û begên Filistiyan bi sedan û bi hezaran ve derbas bûn û Dawid û zilamên wî, tevî Akîş bi hêza paşî ve derbas dibûn[1].
3 Û serokên Filistiyan gotin: Ma çi karê van Îbraniyan li vir hene? Û Akîş ji serokên Filistiyan re got: Ma ev zilama ne yê van rojan, hê jî rastî van salan li cem min e, Dawidê ku qûlê qiralê Îsraêl Saûl e? Û ji roja ku ketiye aliyê min, heta îrojî qet tiştekî di wî de nedîtim.
4 Û serokên Filistiyan bi wî ve hêrs bûn û serokên Filistiyan jê re gotin: Vî zilamî şunda vegerîne cîhê wî, cîhê ku te jê re tayîn kiriye, bila vegere û bi me re nekeve cengê, ya na dê di cengê de neyartiyê bi me re bike; ji ber ku, ma dê bi çi ji efendiyê xwe re maqbûl bibe? Ne bi serê van zilamana?
5 Ma Dawidê ku bona wî di reqsan de bi gotina: Saûl li hezarên wan xist û Dawid jî li deh hezarên wan, ji hev re distirên ne ev e?
6 Û Akîş bangî Dawid kir û jê re got: Bona mafê XUDANê ku zindî ye, tu rast î û di artêşê de jî tevî min derketin û ketina te di çavê min de qenc e; ji ber, ji roja ku tu hatiye cem min heta îrojê di te de xerabiyekê nedîtim; lê belê di çavên began de tu ne qenc î.
7 Û niha vegere û bi xweşiyê here û di çavê begên Filistiyan de xerabiyê neke!
8 Û Dawid ji Akîş re got: Lê belê çi kirime? Û ji roja ku ez li ber te me heta îrojê te di qûlê xwe de çi dîtiye ku, ez nerim li hember neyarên efendiyê xwe qiral re cengê nekim?
9 Û Akîş bersivê da û ji Dawid re got: Ez dizanim ku di çavê min de, tu mîna milyaketekê Xwedê qenc î; lê belê serokên Filistiyan, gotin: Dê tevî me dernekeve cengê!
10 Û niha tu û qûlên efendiyên te, yên ku bi te re hatine, sibehê zû rabin û gava hûn sibehê zû rabûn, heta ku roj tîrêjên xwe bide herin.
11 Û Dawid, bona ku vegere welatê Filistiyan ew û zilamên xwe bona ku sibehê derkevin rê, zû rabûn. Û Filistî hilkişiyan Yîzreêlê.

*Dawid Amalekiyan têk dibe*

30 Û wusa bû ku, dema di roja sêwemîn de Dawid û zilamên xwe gîhaştin Zîklagê, a vay, Amalekiyan êrîşî başûr û Zîklagê kiribûn û li Zîklagê xistibûn û agir bera wê dabûn.
2 Û ji pîrekên ku li wê derê ne, tu kesî nekuştibûn û ji biçûk heta mezin hemû hêsîr girtibûn û wan ajotibûn û bi rêya xwe ve çûbûn.
3 Û Dawid û zilamên xwe hatin bajêr û a vay, bajar hatibû şewitandin û jinên wan û law û qîzên wan bi dîlitî hatibûn birin.
4 Û Dawid û netewa ku li cem wî ne heta ku

[1] An jî: Ji paş re derbas dibûn.

bona giriyê hêz di wan de nemî-
ne bi dengekî bilind giriyan. 5 Û
her du jinên Dawid, Ahînoama
Yîzreêlî û Abîgaîla jina Nabalê
Karmelî jî bi dîlitî hatibûn birin.
6 Û Dawid zehf aciz bû; ji ber ku
netewe: Em wî birecimînin[1] digo-
tin; ji ber ku canê hemûya netewê
ji ber qîz û lawên xwe dişewitî.
Lê belê Dawid, bi Xwedayê xwe
XUDAN ve hêzê dît.
7 Û Dawid, ji kahîn Abîatarê lawê
Ahîmelek re got: Ez rica dikim, ji
min re efodê bîne vir. Û Abîatar
efodê anî navendê, cem Dawid.
8 Û Dawid, bi gotina: Ger ez bi
pêy van êrîşkiran bikevim, gelo
ez ê bigihêjim wan? ji XUDAN
ve pirsî. Û jê re got: Bi pêy wan
bikeve, ji ber ku muheqeq tuyê
bigihêje û muheqeq her tiştî xe-
las bike. 9 Û Dawid, tevî şeş sed
kesên ku pê re ne çû û gîhaştin ne-
wala Besorê û yên ku li paşê mane
li wir sekinîn. 10 Lê belê Dawid bi
çar sed kesî ve li pêy wan diçû, ji
ber ku du sed kesên ku qasî nika-
ribin newala Besorê derbas bikin
westiyane sekinîbûn.
11 Û li beyarê yekî Misirî dîtin û
wî anîn cem Dawid û nan dan wî û
xwar û avê bi wî ve dan vexwarin
12 û pariyek hêjîra hatiye dewisan-
din û du kulîçeyên mewîj dan wî û
xwar û canê wî hate cîhê xwe; ji
ber ku sê roj û sê şev bû nan ne-
xwaribû û av venexwaribû.
13 Û Dawid jê re got: Tu yê kî yî
û ji ku derê yî? Û wî got: Ez qûlê
yekî Amalekî, ciwanek Misirî me
û efendiyê min, min berda, ji ber
ku ez berî sê rojî nexweş ketim.
14 Me êrîşî başûrê Keretiyan û
yê Cihûda û başûrê Kalebê kirin
û agir bi Zîklagê ve berdan. 15 Û
Dawid jê re got: Ma tuyê min bibe
cem van êrîşkiran[2]? Û zilam got:
Bona mafê Xwedê sondê bide
ku tuyê min nekuje û nede destê
efendiyê min, ku ez te bibim cem
van êrîşkiran!
16 Û wî daxist û a vay, li ser
hemûya rûyê erdê ve belav bûbûn;
ji ber talana mezin ya ku ji welatê
Filistiyan û ji welatê Cihûda ve
rahiştibûn dixwarin û vedixwarin
û kêf û şahiyê dikirin. 17 Û Da-
wid ji dema rojhilatê, heta êvara
roja din li wan xist û ji wan, xeynî
çar sed xortên ku li deveyan siwar
bûn û reviyan tu kes xelas nebû.
18 Û Dawid hemûyên ku Amale-
kiyan rahiştibûn, hemû xelas kir û
Dawid her du jinên xwe xelas kir.
19 Û dixwaze bila mezin be, an jî
bila biçûk be, ji law û qîzan û ji
malê talanê û ji tu tiştên ku wan
rahiştibûn, kêmasî nehat dîtin;
Dawid hemû şunda stend. 20 Û
Dawid hemû mîhan û ganêran

1 An jî: Bidin ber keviran.

2 An jî: Tuyê min ji van êrîşkiran re bibe?

rahişt û wan ji pêşiya heywanên
din ve dajotin û: Ev talana Dawid
e! digotin.
21 Û Dawid, gîhaşt cem du sed
zilamê xwe, ên ku qasî nikaribin
li pêy wî herin westiya bûn û wî jî
wan li newala Besorê ve hiştibûn
û bona pêrgîniya Dawid û bona
pêrgîniya netewa ku pê re ne bikin
derketin û gava Dawid nêzîkî ne-
tewê bû; silavê li wan kir. 22 Û
hemû zilamên bêkêr û xerab ên
ku ji nav yên bi Dawid re çûbûn
bersivê dan û gotin: Madem ku bi
me re neçûn, em ê ji malê talanê ê
ku xelas kirine, tu tiştî nedin wan,
bona ku rahêlin û herin, tenê em
ê jin û zarokên wan bidin her zi-
lamî! 23 Û Dawid got: Birayên
min, tiştên ku XUDAN dane me,
hûn ê wusa nekin, wî me parast û
êrîşkirên ku bi ser me ve dihatin,
da destê me. 24 Û ma di vî karî de,
dê kî guh bide gotina we? Ji ber
ku, her para yê ku daketiye cengê
çi be; dê para yê ku li cem perta-
la maye jî ewqas bibe; dê wekhev
werin par kirin. 25 Û wusa bû ku,
li pêy wê rojê, vêya heta îroj bona
Îsraêl kir zagon û darazî.
26 Û Dawid hate Zîklagê û bi go-
tina: A vay, ji talana ku ji neyarên
XUDAN ve hatiye stendin, bona
we xelatek! ji kalepîrên Cihûda re,
ji hevalbendên xwe re, 27 ji yên
ku li Beytelê ne re û ji yên ku li
Ramota li Başûrê ye ne re û ji yên
ku li Yattîrê ne re 28 û ji yên ku li
Aroerê ne re û ji yên ku li Sîfmotê
ne re û ji yên ku li Eştemeoadê ne
re 29 û ji yên ku li Rakalê ne re û
ji yên ku li bajarên Yerahmeêyani
ne re û ji yên ku li bajarê Keniya-
ni ne re 30 û ji yên ku li Hormayê
ne re û ji yên ku li Bor-Aşanê ne
re û ji yên ku li Atakê ne re 31 û ji
hemû cîhên ku Dawid û zilamên
xwe gellek caran çûnê re ji malê
talanê ve şandin.

*Mirina Saûl û Lawên wî*

1.Dîr 10,1-14

31 Û Filistî li dijî Îsraêliyan
cengê kirin û Îsraêlî ji ber
Filistiyan reviyan û yên ku hatin
lêxistin li çiyayê Gîlboayê ketin.
2 Û Filistî li pêy Saûl û lawên wî ze-
liqîn û Filistiyan, li lawên Saûl, Yo-
natan û Abînadab û Malkîşûa xistin.
3 Û ceng, li dijî Saûl zehf dijwar bû
û tîrvanan wî dîtin û zehf ji tîrva-
nan ve aciz bû. 4 Û Saûl ji çekwanê
xwe re got: Şûrê xwe bikişîne û wê
di min de rake, ya na dê ev bêsunet
werin û şûrê xwe di min de rakin û
qerfên xwe dê bi min re bikin. Lê
belê çekwanê wî nexwast ku bike,
ji ber ku zehf tirsiya. Saûl şûrê xwe
rahişt û bi ser wê ve ket. 5 Û gava
çekwanê wî dît ku Saûl miriye, ew
jî bi ser şûrê xwe ve ket û bi wî re
mir. 6 Bi vî awayî Saûl û sê lawên
wî û çekwanê wî û tevî wan hemû
zilamên wî wê rojê pev re mirin.

7 Û ji Îsraêliyan, yên ku li aliyê
dinî çem û li aliyê dinî Urdunê
bûn, dema dîtin ku Îsraêlî direvin
û Saûl û lawên xwe mirin, bajaran
berdan û reviyan û Filistî hatin û
di wan de rûniştin. 8 Û dotira rojê,
gava Filistî bona ku yên hatine
kuştin tazî bikin, hatin dîtin ku Saûl
û her sê lawên wî, li çiyayê Gîlboa
ketine. 9 Û serê wî jêkirin û çekên
wî jêkirin û bona ku mizgîniyê bi-
din mala pûtên xwe û mizgîniyê
bidin netewê bi dorûber şandin
welatê Filistiyan. 10 Û çekên wî
danîn mala Astarîta û cesedê wî
bi dîwarê Beyt-Şanê ve kutandin.
11 Û gelê Yabeş-Gîleadê, dema
tiştên ku Filistî bi Saûl ve kiri-
ne bihîstin, 12 hemûyên egîdan
rabûn û hemûya şevê meşiyan û
meytê Saûl û meytên lawên wî ji
dîwarê Beyt-Şayê rahiştin û hatin
Yabeşê û wan li wir şewitandin.
13 Û hestiyên wan rahiştin û li bin
dara kiferiya ku li Yabeşê ye binax
kirin û heft roj, rojiyê girtin.

# 2. SAMÛYÊL

*Pêşgotin*

Kitêba 2. Samûyêl ya domahiya 1.Samûyêl e, wekî dîroka qiraletiya qiral Dawid e. Dawid pêşiyê bû qiralê Eşîra Cihûda (Birrên 1-4), paşê jî bû qiralê hemûya Îsraêlê (Birrên 5-24).

Kitêba 2. Samûyêl, têkoşîna Dawid ya zeximandina qiraletiya xwe û avakirina yekîtiyê, di hundir û derve de têkoşîna wî ya bi neyarên xwe re kirine, bi awayekî zindî tîne ziman. Ya din peymana ku Xwedê bi Dawid re kiriye û ka dê kî li piştî Dawid derbasî textê wî bibe tîne ziman.

Di vê kitêbê de Dawid mîna yekî bawermend, dilsozê Xwedê û bi hêsanî hurmeta gel qezenc dike tête nasîn. Carna jî mîna yekî xedar, ê ku bi hêsên xwe yî ezperestî kar û gunehan dike tê nasîn. Lê belê dema Peyxamberê Xwedê Natan gunehê wî derxist holê, mukir hat û cezayê ku dê Xwedê bide wi, qebûl kir.

Jiyan û serfiraziyên Dawid ewqasî bandorê li ser gelê Îsraêlê kir ku, dema paşî wî, gel kete nav tengasiyê, bêriya qiralekî ji nifşeya wî û mîna wî ye, kirin.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-4:12 | Qiraletiya Dawid ya Cihûdayê |
| 5:1-24:25 | Qiraletiya Dawid ya hemûya Îsraêlê |
| a.5:1-10:19 | Salên pêşiyê |
| b.11:1-12:25 | Bûyera Dawid û Bat-Şeba |
| c.12:26-20:26 | Tengasî û dijwarî |
| ç.21:1-24:25 | Salên Dawîn |

*Dawid mirina Saûl dibihîze*

1 Û li pêy mirina Saûl wusa bû ku, dema Dawid ji lêxistina Amalekiyan vegeriya, du roj li Zîklagê ma 2 û roja sêwemîn wusa bû ku, a vay, ji cem Saûl, ji artêşgehê zila-

mek hat, kincê wî çiriyabû û li ser
serê wî ax hebû û wusa bû ku, gava
hat cem Dawid, xwe avêt erdê û
secde kir. 3 Û Dawid jê re got: Ma
tu ji ku derê tê? Û zilam jê re got:
Ez ji artêşgeha Îsraêlê ve reviyam
û xelas bûm. 4 Dawid jê re got: Ev
çawa çêbû? Ez rica dikim ji min re
bibêje. Û got: Netewe ji cengê ve
reviya û ji netewê pirr kes jî ketin
û mirin û Saûl û lawê wî Yonatan
jî mirin. 5 Û Dawid ji zilamê ci-
wan, yê ku jê re diaxifî re got: Ma
tu çawa dizane ku Saûl û lawê wî
Yonatan mirine? 6 Û zilamê ci-
wan, yê ku jê re diaxifî got: Ez bi
sererastî li çiyayê Gîlboayê bûm û
a vay, Saûl xwe sipartibû rima xwe
û a vay, erebeyên cengê û siwarî bi
pêy wî zeliqîbûn. 7 Û zîvirî paşiya
xwe û min dît û bangî min kir. Û: A
vay, ez gotim. 8 Û ji min re: Tu kî
ye? got. Û jê re gotim: Ez Amale-
kiyek im. 9 Û ji min re got: Ez rica
dikim, bi ser min ve were û min
bukuje; ji ber ku şaşbûn bi min ve
girt, ji ber ku ez hîn zindî me! 10 Û
ez bi ser wî ve çûm û wî kuştim, ji
ber dizanîbûm ku paşî ketinê, ni-
karîbû sax bimaya û taca ku li ser
serê wî ye û bazinê ku di milê wî
de ye rahiştim û wan anîm vir, ji
efendiyê xwe re.
11 Û Dawid girt û kincê xwe çi-
rand û hemû zilamên ku li cem wî
bûn, wan jî wusa kirin 12 û bona
Saûl û bona lawê wî Yonatan û
bona netewa XUDAN û bona
mala Îsraêlê giriyan û li xwe xistin
û heta êvarî rojiyê girtin; ji ber ku
bi şûr ve ketibûn. 13 Û Dawid ji
zilamê ciwan, yê ku jê re axifî re
got: Tu ji ku derê yî? Û zilam: Ez
lawê Amalekiyek mêvan im got.
14 Û Dawid jê re got: Çawa te
bona kuştina Mesîhê XUDAN, ji
dirêj kirina destê xwe netirsiya?
15 Û Dawid bangî xulamekî kir
û: Nêzîk bibe û li viya bixe! got.
Û ew li wî xist û ew mir. 16 Û
Dawid jê re got: Bila xwîna te li
ser serê te be! ji ber ku, bi gotina:
Mesîhê XUDAN kuştim, devê te
li dijî te şahdeyiyê kir.

*Lawija ku Dawid ji bo Saûl û Yonatan gotiye*

17 Û Dawid, li ser Saûl û lawê
wî Yonatan vê lawijê xwend.
18 Û bona ku helbesta kevanê hînî
lawên Cihûda bike, ji wan re got;
a vay, di pirtûka Yaşar[1] de hatiye
nivîsandin:
19 Ya Îsraêl, li ser cîhên te yên bi-
lind mezintiya te hate kuştin!
Egîd çawa jî ketin!
20 Bona ku qîzên Filistiyan
kêfxweş nebin, bona ku qîzên
bêsunetan bi kêfxweşiyê ve
necoşin, li Gatê vêya nedin bihîs-
tin, di kuçeyên Aşkelonê de belav
mekin!

1 An jî: Pirtûka duristan.

21 Ya çiyayên Gîlboa, bila ne
xunav, ne baran ne jî zeviyên
pêşkêşiyê li ser we hebin!
Ji ber ku mertala egîdan li wir
rahiştin û avêtin, mertala Saûl, ya
ku bi rûnê ve nehatiye mesh kirin.
22 Ji xwîna yên ku hatine kuştin,
ji rûnê egîdan, kevana Yonatan bi
şûnda nedihat û şûrê Saûl vala ve-
nedigeriya.
23 Û Saûl û Yonatan di jiyanên xwe
de şêrîn û dilnîwaz bûn, di mirina
xwe de jî cuda nebûn; ji qertelan
jîrtir, ji şêran ve xwurttir bûn.
24 Ya qîzên Îsraêl, ji Saûl re bi-
girîn, wî qumaşê biqîmet yê sor
li we kir, xemla zêrîn danî ser
kincên we!
25 Di nava cengê de mêrxas çawa
ketin! Yonatan li cîhên te yên bi-
lind hate kuştin.
26 Ya birayê min, Yonatan, ez
bona te bi êş im! Tu bona min
zehf şêrîn bû; hezkirina te, bona
min tiştekî şaş kirî bû, ji hezkirina
pîrekê zêdetir bû!
27 Mêrxas çawa ketin û çekên
cengê çawa tune bûn!

*Dawid dibe Qiralê Cihûda*
1.Sam 16,1-13; 2.Sam 5,1-5

2 Û li pêy vêya wusa bû ku, Da-
wid bi gotina: Gelo ez hilkişim
bajarekî ji bajarên Cihûda? ji
XUDAN ve pirsî. Û XUDAN jê
re got: Hilkişe. Û Dawid got: Ez
hilkişim ku derê? Û got: Heb-
ronê. 2 Û Dawid û her du jinên
wî, Ahînoama Yîzreêlî û Abîgaîla
jina Nabalê Karmelî jî hilkişiyan
wir. 3 Û Dawid, zilamên li cem
wî ne, her kesî tevî maliyên wî bir
û di bajarên Hebronê de rûniştin.
4 Û zilamên Cihûda hatin û li wir
Dawid, li ser mala Cihûda, bona
ku bibe qiral mesh kirin.
Û bi gotina: Yên ku Saûl binax
kirine, gelê Yabeş-Gîlead in ji Da-
wid re gotin. 5 Û Dawid şandiyan
ji gelê Yabeş-Gîlead re şand û ji
wan re got: Hûn ji aliyê XUDAN
ve pîroz bibin, ji ber ku we vê
xêrê ji efendiyê xwe re, ji Saûl re
kirin, we wî binax kirin! 6 Bila
niha XUDAN jî xêr û dilsoziyê ji
we re bike û ji ber ku we vî tiştî
kirin, ez ê jî berdêla vê qenciyê
bidim we. 7 Niha bila destên we
xwurt bibin û mêrxas bibin; ji ber
ku efendiyê we Saûl mir û mala
Cihûda, min jî li ser xwe, bi qira-
letî mesh kirin.

*Şerê di navbera Îsraêl û Cihûda de*

8 Û serokê artêşa Saûl, Abnerê
lawê Ner, lawê Saûl Îş-Boşet gir-
tibû û wî derbasî Mahanaîmê ki-
ribû 9 û wî li ser Gîlead û Asûrî û
Yîzreêl û Efrayîm û Benyamîn û
li ser hemûya Îsraêlê re kir qiral.
10 Îş-Boşetê lawê Saûl, dema li
ser Îsraêlê bû qiral çel salî bû û
du salî qiraletiyê kir. Lê belê mala
Cihûda li pêy Dawid ve çû. 11 Û

hejmara rojên ku Dawid li Heb-
ronê, li ser mala Cihûda ve bûbû
qiral heft sal û şeş meh bûn.
12 Û Abnerê lawê Ner, tevî
qûlên Îş-Boşetê lawê Saûl, ji
Mahanayîmê hilkişiya Gîbeonê.
13 Û Yoabê lawê Serûya û qûlên
Dawid hilkişiyan û li cem burka
Gîbeonê rastî wan hatin û ew li
aliyekî burkê û yên din jî li aliyê
dinî burkê rûniştin. 14 Û Abner ji
Yoab re got: Ez rica dikim, bila
ciwan rabin û li ber me bilîzin. Û
Yoab got: Bila rabin. 15 Û rabûn
û bona Benyamîn û Îş-Boşetê
lawê Saûl donzdeh kes û ji qûlên
Dawid ve donzdeh kesî bi hejma-
ran ve bijartin. 16 Û her kes bi
serê yê ku li hemberê wî ye girt û
şûrê xwe li sînga yê ku li hember
wî ye rakir û pev re ketin û ji ew
cîhê ku li Gîbeonê ye re, Helkat-
Hatsûrîm[1]hate gotin. 17 Û ew roj
ceng zehf dijwar bû û Abner û zi-
lamên Îsraêlê, li ber qûlên Dawid
ve xera bûn.
18 Û sê lawê Serûya, Yoab û
Abîşay û Asahel li wir bûn û
Asahel mîna xezalekî beyaran bi
lingê xwe ve bilez bû. 19 Û Asa-
hel li pêy Abner ve ket û dema
dimeşiya ji pêy Abner ve bi çep
û rastê ve neçewtiya. 20 Û Abner
li paşiya xwe ve nihêrt û got: Ma
tu yî Asahel? Û ew: Ez im got.

1 Zeviya kêran.

21 Û Abner jê re got: Bizivire
çepê xwe an jî rastê xwe û ji xu-
laman bi yekî bigire û çekên wî
rahêje! Lê belê Asahel nexwest
ku ji pêy wî bizivire. 22 Û Abner
carekî din ji Asahel re got: Ji pêy
min vegere; ma çima ez, te li erdê
ve dirêj bikim? Û ma ez çawa
li rûyê birayê te Yoab binêrim?
23 Lê belê ew nexwest ku bizi-
vire; Abner jî bi serîkê dawiya
rimê li zikê wî xist û rim ji paşiya
wî ve derket û li wê derê ket û li
cîhê ku lê ye mir û wusa bû ku,
hemûyên ku hatin cîhê Asahel lê
ketiye û miriye, sekinîn.
24 Û Yoab û Abîşay bi pêy Abner
ve ketin û li rêya çola Gîbeonê,
li ber Gîahê, gava gîhaştin girê
Ammayê roj çû ava. 25 Û lawên
Benyamîn li pêy Abner ve civi-
yan û bûn komek û li serê girekê
sekinîn. 26 Û Abner bang kir û ji
Yoab re got: Ma bila şûr bêsekin
bixwe û biqedîne? Ma tu nizanî
ku di dawiya wê de tahlî dibe?
Û heta kengî bona ku ji pêy bi-
rayên xwe vegerin tuyê ji netewê
re nebêjî? 27 Û Yoab got: Bona
mafê Xwedanê ku zindî ye, ger
te negotiba, hîn ji sibehê dê ji
netewê her yek, ji pêy birayên
xwe vegeriyabûna û bi rêya xwe
ve çûbûna. 28 Û Yoab li boriyê
ve xist û hemûya netewê sekinîn
û êdî li pêy Îsraêlê, bera wê ne-
dan û êdî carekî din cengê neki-

rin. 29 Û Abner û zilamên wî, di
hemûya wê şevê de, ji Arabayê[1]
ve meşiyan û Urdunê derbas ki-
rin û hemûya Bîtronê meşiyan û
hatin Mahanayîmê.
30 Û Yoab ji pêy Abner ve zi-
virî û hemûya netewê civand û ji
qûlên Dawid nozdeh kes û Asahel
kêm bûn. 31 Qûlên Dawid jî ji
Benyamînê û ji zilamê Abner ve
lêxistin, sê sed û şêst kes mirin.
32 Û Asahel rakirin û wî li gora
bavê wî, ya ku li Beytlehemê yî
binax kirin. Û Yoab û zilamên wî
di hemûya şevê de meşiyan û roj
di Hebronê de ji wan re hilat.

*Dawid xwurt dibe*

1.Dîr 3,1-4

3 Û cenga di navbera mala Saûl
û mala Dawid de dirêj bû û
Dawid her ku diçû xwurt dibû, lê
belê mala Saûl lawaz diket.
2 Û li Hebronê, ji Dawid re law hatin
dinê û lawê wî yê yekem, Amnonê
ku ji Ahînoama Yîzreêlî bûye bû
3 û yê duwem Kîleabê ku ji Abîgaî-
la jina Nabalê Karmelî bûye bû û yê
sêwem, Abşalomê ku ji Maakaya
qîza Talmayê qiralê Geşûr bûye bû
4 û yê çaran Adoniya lawê Haggît
bû û yê pêncan Şefatya lawê Abîtal
bû 5 û yê şeşan Îtreamê ku ji Egla-
ya jina Dawid ve çêbûyî bû. Vana li
Hebronê ji Dawid re bûn.

*Abner tavî Dawid dibe*

6 Û dema cenga di navbera mala
Saûl û mala Dawid de bû, wusa
bû ku, Abner li mala Saûl, xwe
xwurt dikir. 7 Û cariyek Saûl
hebû û navê wê Rîtspaya qîza
Ayya bû û Îş-Boşet ji Abner re
got: Ma çima tu ket cem cariya
bavê min? 8 Û li ser gotinên Îş-
Boşet, Abner zehf hêrs bû û got:
Ma ez serkûçikek ku aliyê Cihû-
da digire me qey? Ez îro xêrê bi
mala bavê te Saûl û ji birayên wî
re û ji hevalên wî re dikim û te ne-
dam destê Dawid; lê belê îroj, tu
ji ber vê pîrekê fesadiyê li ser min
dikî. 9 Ger ez qiraletiyê ji mala
Saûl ve derbas nekim û ji Danê
heta Beer-Şebayê, bona texta Da-
wid li ser Îsraêlê û li ser Cihûda
ve bisekinînim, 10 mîna ku XU-
DAN ji Dawid re sond xwariye, li
gor wê nekim, bila Xwedê wusa
û jê zêdetir li Abner re bike! 11 Û
ji ber ku ji Abner ve ditirsiya, êdî
bersivê neda wî.
12 Û Abner ji aliyê xwe ve,
şandiyan ji Dawid re şand û got:
Ma welat yê kî ye? Û: Peymana
xwe bi min re bike û a vay, bona
ku hemû Îsraêlê bizivirînim te, dê
destê min bi te re be, got. 13 Û
Dawid got: Zehf qenc e, ez ê bi
te re peymanê deynim; lê tenê ez
ê tiştekî ji te bixwazim; ew jî ev
e: Gava tu bona dîtina min were,
ger tu Mîkala qîza Saûl bi xwe

[1] Newala kûr ya li başûr û bakurê çemê Lût e.

re neyne, tuyê wecê min nebîne.
14 Û Dawid, şandiyan ji Îş-Boşetê
lawê Saûl re şand û got: Mîkala
ku bi sed gûlfeyên Filistiyan, ji
xwe re kiribûm destgirtî, jina min
bide! 15 Û Îş-Boşet zilaman şand
û pîrekê ji mêrê wê, ji Paltîelê
lawê Laîş ve sitend. 16 Û mêrê
wê, tevî wê heta Bahûrîmê li pêy
wê meşiya û giriya û çû. Û Abner
jê re got: Here, vegere! û zilam
vegeriya.
17 Û Abner bi kalepîrên Îsraêlê
re axifî û got: Pêşiyê we li Dawid
digeriyan ku bona li ser we
bibe qiral 18 û niha bikin, ji ber
ku XUDAN, bi gotina: Ez ê bi
destê qûlê xwe Dawid, netewa
xwe Îsraêlê ji destê Filistiyan û ji
destê hemû neyarên wan ve xelas
bikim, bona Dawid got. 19 Û Abner
bi Benyamîn re jî axifî û Abner
bona hemû tiştê ku di çavê Îsraêl
de û di çavê mala Benyamîn
de qenc e, li Hebronê ji Dawid re
bibêje, çû. 20 Û Abner, tevî bîst
kesên ku li cem wî bûn, hate Hebronê
cem Dawid. Û Dawid bona
Abner û zilamên ku li cem wî
bûn, xwarinekê danî. 21 Û Abner
ji Dawid re got: Ez rabim herim
û hemûya Îsraêlê ji efendiyê xwe
re, ji qiralê xwe re bicivînim û
bila bi te re sondê bidin û tuyê ji
li ser hemûyên ku canê te dixwazî
qiraletiyê bikî. Û Dawid Abner
şand; ew jî bi silametî çû.

*Yoab Abner dikuje*

2.Sam 2,19-23

22 Û a vay, qûlên Dawid û Yoab
ji êrîşê vegeriyan û bi xwe re gelekî
malên talanê anîn û Abner li
Hebronê ne li cem Dawid bû, ji
ber ku wî şandibû û ew jî bi selametî
çûbû. 23 Û tevî Yoab, bi wî
re hemûya artêşê hat û gîhandin
Yoab û jê re gotin: Abnerê lawê
Ner hate cem qiral û wî ew şand,
ew jî bi selametî çû. 24 Û Yoab
hate cem qiral û jê re got: Te çi
kir? A vay, Abner hatiye cem te;
ma çima te wî şand û ew jî bi serbestî
çû? 25 Tu bi Abnerê lawê
Ner dizanî, bona ku te bixapîne û
ketin û derketina te fêhm bike û
bona hemû tiştên ku tu dikî bizanibe
hat. 26 Û Yoab ji cem Dawid
derket û li pêy Abner şandiyan
şand û wî ji bîra Sîrayê şunde vegerandin;
lê belê hayê Dawid jê
tunebû.
27 Û Abner vegeriya Hebronê û
Yoab, bona ku pê re biaxife wî bir
navbera derî û bona xwîna birayê
xwe Asahel, li wir li zikê wî xist,
ew jî mir. 28 Û paşî vêya, gava
Dawid ev yekê bihîst, got: Li ber
XUDAN di xwîna Abnerê lawê
Ner de abadîn sûcê min û qiraletiya
min nîne! 29 Bila bikeve ser
serê Yoab û ser hemû mala bavê
wî û ji mala Yoab ve bila zilamê
ku (xwîn) jê diherike û yê bi cizam
û yê ku xwe disipêre çoyê

bin milan û yê bi şûr ve bikeve û
zilamê ku motajî nan e kêm nebe!
30 Bi vî awayî Yoab û birayê xwe
Abîşay, Abner kuştin, ji ber ku wî
birayê wan Asahel, li Gîbeonê, di
cengê de kuştibû.
31 Û Dawid ji Yoab re û ji hemû
netewa ku li cem in re got: Kincê
xwe biçirînin û pertalan[1] li xwe
bikin û ji bo Abner şînê bigirin!
Û qiral Dawid li pêy darbestê
dimeşiya. 32 Û li Hebronê
Abner binax kirin û qiral, li ser
gora Abner bi dengekî bilind
giriya û hemûya netewê giriyan.
33 Û qiral bona Abner lawijê
xwend û got:
Ma divê Abner bi kuştina ehme-
qan ve bimiriya?
34 Destên te nehatibûn girêdan
û lingên te li qeydê ve nehatibû
lêxistin; mîna ku li ber lawên xe-
rabiyê ve bikeve; tu wusa ket!
Û hemûya netewê, carekî din li ser
wî giriyan. 35 Û hemûya netewê,
hîn ku roj bû bona nan xwarinê bi-
dine ber, hatin cem Dawid; lê belê
Dawid sondê da û got: Ger berî
rojhilatinê ez nan, an jî tiştekî din
tahm bikim, bila Xwedê ûsa û zê-
deyî ji min re bike! 36 Û hemûya
netewê, bona vê yekê bala xwe
danê û mîna ku her kirinên qi-
ral, di çavên netewê de qenc tête
xuyanî kirin, ev jî di çavên wan
de qenc hate xuya kirin. 37 Û
hemûya netewê û hemû Îsraêl ew
roj fêhm kirin ku lêxistina Abnerê
lawê Ner ne ji qiral e. 38 Û qiral ji
qûlên xwe re got: Ma hûn nizanin
ku îro li Îsraêlê serokek, zilamekî
mezin ketiye? 39 Û ez, çawa ku
qiralekî ḥatiye mesh kirî me, lê
belê îroj ez lawaz im; ev zilaman,
lawên Serûya, ji min dijwartir in;
bila XUDAN ji yê ku xerabiyê
dike re, li gor xerabiya wî bide!

*Kuştina Îş-Boşet*

4 Û gava Îş-Boşetê lawê Saûl
bihîst ku Abner li Hebronê mi-
riye, destên wî sist bûn û hemûya
Îsraêlê şaş bûn. 2 Û du zilamê se-
roknijde ên Îş-Boşetê lawê Saûl
hebûn; vana lawên Rîmmoyê
Beerotiyê ku ji lawên Benyamîn
e bûn û navê yekî Baana û yê din
jî Rekab bû; – ji ber ku Beerot jî
yê Benyamîn tête hesibandin 3 û
yên Beerotî reviyan Gîttaîmê û
heta îrojê li wir bûn mêvan. –
4 Û lawekî ling kûdê Yonatanê
lawê Saûl hebû. Dema ji Yîzreêlê
agahiya mirina Saûl û Yonatan
hatin pênc salî bû û pîrika wî, ew
rahişt û revand û ji ber, bona ku
bireve lezand, lawik ket û kûd bû.
Û navê wî Mefîboşet bû.
5 Û dema Îş-Boşet, wexta nîvrojê
radiwestiya, Rekab û Baanayê
lawên Rîmmoyê Beerotî di
demên germ ên rojê de hatin

[1] Alavan.

mala wî. 6 Û wekî ku genim tînin
ketin mala wî û ji zikê wî ve lê
xistin û Rekab û birayê wî Baana
reviyan û xelas bûn. 7 Û gava ew
ketin malê, di odeya raketinê de,
li ser livînan radiket û li wî xistin
û wî kuştin û serê wî jê kirin û
serê wî rahiştin û di hemûya şevê
de, di rêya Araba de meşiyan.
8 Û serê Îş-Boşet anîn Hebronê,
cem Dawid û ji qiral re gotin:
A vay, neyarê te, ê ku li canê te
digeriya, serê Îş-Boşetê lawê
Saûl û XUDAN ji Saûl û ji nîjada
wî ve, bona efendiyê min, ji qiral
re îroj tol hildanan bexşand. 9 Û
Dawid bersivê da Rekab û birayê
wî Baanayê lawên Rîmmoyê
Beerotî û ji wan re got: Bona
mafê XUDANê ku zindî ye û
canê min ji hemû tengasiyan ve
xelas dike, 10 li gor xwe mîna ku
mizgîniyê tîne, gava zilamek, bi
gotina: A vay, Saûl mir! agahiyê ji
min re anî, wî girtim û li Zîklagê
wî kuştim; bexşîşa bona nûçeya
ku aniye dam wî ev bû. 11 Hela
zilamên xerab, salihekî di mala
wî de, li ser livînên wî bukujin û
qey ez ê di destên we de xwîna
we negerim û we ji dinê ranekim?
Û Dawid emir da xulaman û
wan kuştin û dest û lingên wan
jêkirin û li Hebronê, li cem burkê
daliqandin. Lê belê serê Îş-Boşet
rahiştin û li Hebronê, li gora
Abner binax kirin.

*Dawid dibe Qiralê Îsraêlê*

1.Dîr 12,23-40; 11,1-3

5 Û hemû nîjadên Îsraêlê, hatin
Hebronê, cem Dawid û pê re
axifîn û jê re gotin: A vay, em hestî
û goştê te ne. 2 Çawa ku di demên
derbasbûyî de Saûl li ser me qiral
bû, lê yê ku Îsraêlê derdixist der-
ve û dianî tu bû û XUDAN ji te re
got: Tuyê netewa min, Îsraêl bajo
û tuyê li ser Îsraêlê ve bibe serok.
3 Û hemû kalepîrên Îsraêlê hatin
Hebronê, cem qiral û qiral Dawid,
li Hebronê, li ber XUDAN, bi wan
re peymanê birrî û Dawid, li ser Îs-
raêlê bi qiraletî mesh kirin. 4 Dema
Dawid bû qiral, sîh salî bû û çel salî
qiraletiyê kir. 5 Li Hebronê, li ser
Cihûda, heft sal û şeş meh qirale-
tiyê kir û li Orşelîmê, li hemûya
Îsraêlê û Cihûda sîh û sê sal qira-
letiyê kir.
6 Û qiral û zilamên wî çûn
Orşelîmê, li dijî gelê warê Yebûsi-
yan û vana bi Dawid re axifîn û jê
re gotin: Tuyê nekeve vê derê, lê
belê dê kor û kûd te biqewirînin;
bi vêya dixwestin bibêjin ku: Da-
wid nikare bikeve vê derê. 7 Lê
belê Dawid birca Siyonê girt; ba-
jarê Dawid ev der e. 8 Û Dawid
wê rojê got: Her kî ku li Yebûsi-
yan bixe û bigihêje rêya avê û li
kor û kûdên ku canê Dawid ji wan
dikerihe! Ji ber vêya dibêjin: Dê
kor û kûd nekevin malê. 9 Û Da-
wid li bircê rûnişt û jê re got ba-

jarê Dawid. Û Dawid ji Mîlloyê
ve bi hawirdor û berbi hundir ve
ava kir. 10 Û Dawid her ku diçû
mezin dibû û Xwedayê artêşan
XUDAN bi wî re bû.
11 Û Hîramê qiralê Sûrê, şandiyan, darên erzê, necaran û hosteyên dîwêr ji Dawid re şand û bona Dawid xaniyekî ava kirin.
12 Û Dawid fêhm kir ku XUDAN li ser Îsraêlê, bi qiraletiyê wî zeximandibû û bona xatirê qewma xwe Îsraêl jî qiraletiya wî bilind kiribû.
13 Û paşî ku Dawid ji Hebronê ve hat ji Orşelîmê dîsa cariyan û jinan sitend û dîsa law û qîzan ji Dawid re anîn dinê.
14 Û navên yên ku li Orşelîmê jê re bûyîne ev in: Şammûa û Şobab û Natan û Silêman
15 û Îbhar û Elîşûa û Nefeg û Yafîa
16 û Elîşama û Elyada û Elîfelet.

*Filistî mexlûb dibin*

1.Dîr 14,8-17

17 Û Filistiyan, bi qiraletî li ser Îsraêlê mesh kirina Dawid bihîstin û hemûyên Filistî, bona ku li Dawid bigerin derketin û Dawid bihîst û daket bircê.
18 Û Filistî hatin û di newala Refayîmê de belav bûn.
19 Û Dawid ji XUDAN pirsî û got: Gelo ez li dijî Filistiyan derkevim? Gelo tuyê wan bidî destê min? Û XUDAN ji Dawid re got: Derkeve, ji ber ku muheqeq ez ê Filistiyan bidim destê te.
20 Û Dawid hat Baal-Peratsîmê û Dawid li wir li wan xist û: Mîna av bendan dişkînin XUDAN jî neyarên min li ber min şikenand û got. Ji ber vê yekê navê Baal-Peratsîm[1] lê kir.
21 Û wan pûtên xwe li wir hiştin û Dawid û zilamên wî wan girtin û birin.
22 Û Filistî carekî din derketin û di newala Refayîmê de belav bûn.
23 Û Dawid ji XUDAN re pirsî û XUDAN got: Tuyê dernekeve; ji paş wan bizivire û li hember darên tûyê, bi ser wan ve were.
24 Dê ew gav wusa bibe ku, dema tu ji ser darên tûyê ve dengê meşê bibihîze, tuyê dest bi tevgerê bike; ji ber, XUDAN bona ku li artêşa Filistiyan bixe, ji pêşiya te, ew gav derketiye.
25 XUDAN çawa destûrê dabe wî Dawid wusa kir û ji Gebayê heta Gezerê li Filistiyan xist.

*Sindoqa Peymanê tînin Orşelîmê*

1.Dîr 13; 15; 16; Zeb 132

6 Û Dawid, dîsa li Îsraêlê hemû zilamên bijartî civand, sîh hezar kes.
2 Û Dawid rabû û bona Sindoqa Xwedayê ku, bi nav, bi navê XUDANê artêşan yê ku li ser kerûbiyan rûniştiye tête bang kirin, ji Baale-Cihûda ve derxîne, tevî hemûya netewa ku li cem in, çû wir.
3 Û Sindoqa Xwedê li erebeyek nû siwar kirin û wê ji mala

---

[1] Cihê neqeban.

Abînadab, ya ku li jorîn e rakirin;
Uzza û Ahyo yên lawên Abînadab
erebeya nû dajotin. 4 Û tevî Sin-
doqa Xwedê wê ji mala Abîna-
dab, ya ku li jorîn e rakirin û Ahyo
ji ber Sindoqê ve dimeşiya. 5 Û
Dawid û hemû mala Îsraêl, bi her
cûre sazên ji darê serwiyê ne û bi
çenkan û bi santûran[1] û bi tefan û
bi zengilkan û bi zîlan li ber XU-
DAN dilîstin.

6 Û hatin cîhê bêndera Nako û
Ûzza destê xwe dirêjî Sindoqa
Xwedê kir û pê girt, ji ber ku ga
çerixîbûn. 7 Û hêrsa XUDAN li
dijî Ûzza rabû û ji ber bêramaniya
wî Xwedê li wir, li wî xist û li wir,
li ber Sindoqa Xwedê mir. 8 Û Da-
wid hêrs bû, ji ber ku XUDAN li
Ûzza xistibû û heta îroj ji wê dera
re Perets-Ûzza[2] tête gotin. 9 Û
Dawid wê rojê ji XUDAN tirsiya
û got: Ma dê çawa Sindoqa XU-
DAN were cem min? 10 Û Dawid
nexwest ku Sindoqa XUDAN
bikşîne cem xwe, bajarê Dawid
û Dawid wê ber bi mala Obêd-
Edomê Gatî ve şand[3]. 11 Û Sindo-
qa XUDAN, sê meh li mala Obêd-
Edom ma û XUDAN Obêd-Edom
û hemûya mala wî bi berdar kir.

12 Û bi gotina: XUDAN, ji ber
Sindoqa Xwedê, mala Obêd-
Edom û hemûyên ku aidî wî ne
bi berdar kir gîhandin Dawid. Û
Dawid çû û ji mala Obêd-Edom,
Sindoqa Xwedê bi kêfxweşî
hilkişand bajarê Dawid. 13 Û
wusa bû ku, gava yên ku Sindoqa
XUDAN dikişînin, dema şeş gavî
çûn ganêrekî û golikek qelew qur-
ban kir. 14 Û Dawid li ber XU-
DAN, bi hemû hêza xwe direqisî
û Dawid efodê kitan li xwe kiribû.
15 Û tevî Dawid, hemûya Îsraêlê
bi qêrîn û dengê boriyan Sindoqa
XUDAN hildikişandin.

16 Û wusa bû ku, dema Sindoqa
XUDAN hate bajarê Dawid, Mîka-
la qîza Saûl ji şivakê ve nihêrt û
dît ku, qiral Dawid, li ber XUDAN
direqise û hol dibe û di dilê xwe
de wî biçûk dît. 17 Û Sindoqa XU-
DAN anîn hundir û danîn cîhê li
nava çadira ku Dawid bona wê ava
kiribû û Dawid tevî pêşkêşiyên ku
li ber XUDAN tên şewitandin,
pêşkêşiyên xweşiyê pêşkêş kirin.
18 Û gava Dawid pêşkêşkirina
pêşkêşiya şewitandinê û pêşkêşiya
xweşiyê qedand, bi navê XU-
DANê artêşan, netewê pîroz
kir. 19 Û ji hemûya netewê re, ji
hemûya civaka Îsraêlê re, ji jin û
mêr, ji her kesî re nanekî somî û
pariyek goşt û pîdeyek mewîjan
belav kir. Û hemûya netewê, her
kes çûn malên xwe.

---

*1* Cûreyekî sazê ye.
*2* Neqeba Ûzza.
*3* An jî: Rêya wê bi wir ve çewt kir.

20 Wê gavê Dawid, bona ku ma-
liyên xwe pîroz bike vegeriya. Û
Mîkala qîza Saûl, bona ku pêr-
gîniya Dawid bike derket û got:
Qiralê Îsraêlê, yê ku îroj li ber ca-
riyeyên qûlên xwe tenê mîna xwe
bêşermezarî tazî kirina zilamên
bêrêz, xwe tazî kiriye, îroj çiqas
bi şeref bû! 21 Û Dawid ji Mîkalê
re got: XUDANê ku, bona min li
ser netewa XUDAN, li ser Îsraêlê
serwer bike, yê ku li dêvla bavê
te û li dêvla hemûya maliyên wî
min bijartiye, belê, ez dixwazim
li ber XUDAN bilîzim. 22 Û ez
ê ji vêya zêdetir nizm bibim û ez
ê di çavê xwe de bibim nizmok;
lê belê dê cariyeyên ku te gotine
hurmetê rê min bidin! 23 Û heta
roja mirina Mîkala qîza Saûl, za-
rokên wê çênebûn.

*Soza ku Xwedê dide Dawid*

1.Dîr 17,1-15; 28,2-7; 1.Qir 8,14-21

7 Û wusa bû ku, dema qiral li
mala xwe rûnişt û XUDAN
bi hawirdorê ji neyarên wî ve
aramiyê dayê, 2 qiral ji peyxam-
ber Natan re got: Lê binêre, ez li
malekî ji darê erzê ye rûdinim, lê
belê Sindoqa Xwedê di nava per-
deyan de dimîne. 3 Û natan ji qiral
re got: Here, her tiştên ku di dilê
te de ne bike; ji ber ku XUDAN
bi te re ye. 4 Û wê şevê wusa bû
ku, ev gotina XUDAN ji Natan
re hat: 5 Here û ji qûlê min Da-
wid re bibêje; XUDAN wusa
dibêje: Ma tuyê bona ku ez rûnim
xanî ji min re ava bikî? 6 Ji ber,
ji roja ku lawên Îsraêl ji Misirê
derxistime heta îroj, di xaniyekî
de rûneniştime, lê belê di çadir û
şunwarê bûnê de meşiyam. 7 Di
hemû cîhên ku bi hemûyên lawên
Îsraêl ve meşiyame de, ji nîjade-
kî Îsraêlê, ya ku bona netewa min
bajon, emirê dame wan re, tu carî
gotina: Ma çima we xaniyekî ji
darê erzê ji min re ava nekirine?
tu tiştekî gotime? 8 Û niha, tuyê
ji qûlê min Dawid re wusa bibêje:
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Bona ku tu li ser netewa min, li
ser Îsraêlê bibe serwer, te ji govê,
ji pêy mîhan rahiştim 9 û li hemû
cîhê ku tu meşiya ez bi te re bûm û
hemû neyarên te ji ber te rakirim û
avêtim û ez ê navekî mezin, mîna
mezinên li dinê ne ji te re bikim.
10 Û ez ê bona netewa xwe Îsraêl
cîhekî hilbijêrim û wê deynim û
dê li cîhê xwe rûnê û êdî nelerize
û êdî zarokên xerabiyê mîna berê
û mîna ji roja ku serweran li ser
netewa xwe Îsraêlê danî me, dê
nikaribin wan nizm bikin 11 û ez ê
ji hemû neyarên te, aramiyê bidim
te. Û XUDAN ji te re digehîne,
dê XUDAN bona te xaniyekî ava
bike! 12 Û dema rojên te tijî bibin
û tu bi bapîrên xwe re rakeve, ez
ê nîjada ku ji zûriyeta te derkeve,
li pêy te bisekinînim û ez ê qiralên

wê bizexmînim. 13 Û dê bi navê
min xaniyê ava bike û ez ê textê
qiraletiya wî abadîn sabît[1] deynim.
14 Ez ê jê re bibim bav û dê ew jî ji
min re bibe law û ger ew xerabiyê
bike, ez ê wî bi çoyê mirovan, bi
lêxistinên lawên mirov perwerde
bikim; 15 lê belê mîna xêra xwe
ji Saûlê ku ji ber te hilanîme siten-
dim, dê ji wî neyê sitendin. 16 Û
mala te û qiraliya te dê abadîn li
ber te, di ewledariyê de bibin; dê
abadîn bibe xwediyê textê; texta
te dê abadîn li cîhê xwe bimîne.
17 Û Natan li gor hemûya van go-
tinan û li gor hemûya vê xewn û
xeyalê ji Dawid re got.

*Dua Dawid*

1.Dîr 17,15-27

18 Û qiral Dawid ket hundir û li
ber XUDAN rûnişt û got: Ya Xu-
dan, XUDAN, ez kî me û mala
min çî ye ku te min anî vê derê?
19 Ya Xudan, XUDAN, ev di çavê
te de tiştekî biçûk hate xuyanî kirin
û te demekî dirêj di derheqê mala
qûlê xwe de jî got û li gor tehe-
ra mirovan, ya Xudan, XUDAN!
20 Û Dawid dê êdî bikaribe ma çi
ji te re bibêje? Ji ber ku tu bi qûlê
xwe dizanî, ya Xudan, XUDAN!
21 Bona ku tu bigihîne qûlê xwe,
te hemû vê mezintiyê di oxra go-
tina xwe de û li gor dilê xwe çêkir.
22 Bo vê yekê, ya XUDAN Xwe-
dê! tu çiqas mezin î; ji ber ku, li
gor hemû tiştên ku me bi guhên
xwe bihîstine mîna te nîne û xeynî
te Xwedê nîne. 23 Û mîna netewa
te, mîna Îsraêlê, li dinê kîjan ne-
tewe heye ku, Xwedê bona ku wê
ji xwe re bi neteweyî xelas bike
û bona ku ji xwe re nav û deng
çêbike û bona ku ji we re tiştên
mezin çêke û li ber netewa xwe
ya ku ji Misirê, ji neteweyan û ji
îlahên wan xelas kiriye, bona ku
ji bo welat tiştên tirsehêz çêbike
meşiya be? 24 Û te netewa xwe
Îsraêl, bi neteweyek abadîn bona
xwe sabît danî û tu, ya XUDAN, tu
ji wan re bû Xwedê. 25 Û niha ya
XUDAN, Xwedê, gotina ku te di
derheqê qûlê xwe de û di derheqê
mala wî de gotiye abadîn bisekinî-
ne û mîna ku te gotiye bike! 26 Û
bila bi gotina: XUDANê artêşan,
li ser Îsraêlê Xwedê ye, bila navê
te abadîn bête mezin kirin û mala
qûlê te Dawid bila li ber te li cîh
bimîne. 27 Ji ber ku tu, XUDANê
artêşan, Xwedayê Îsraêlê, te bi
gotina: Ez ê xaniyekî bona te ava
bikim guhê qûlê xwe vekir; ji ber
vê yekê qûlê te, bona ku vê duayê
bike, dilawêrî di xwe de dît.
28 Û niha, ya Xudan, XUDAN, tu
Xwedê yî û gotinên te rast in û te
ev tiştê qenc ji qûlê xwe re wad
kir 29 û bona ku abadîn li ber te
be, pîroz kirina mala qûlê te, niha

1 An jî: Pêdandî.

bila ji te re qenc were xuya kirin; ji ber ku ya Xudan, XUDAN, te got û bila mala qûlê te bi berdariya te abadîn pîroz bête deynîn!

*Serfiraziyên Dawid*
1.Dîr 18,1-17

8 Û li pêy vêya wusa bû ku, Dawid li Filistiyan xist û wan xist bin hikma xwe û hefsarên serbajêrê ji destê Filistiyan ve girt.
2 Û li Moabê xist û wan li erdê dirêj kir û bi tayê pîvanê ve wan pîva û bona ku du rêzî bukujin û bêkêmasî rêzekê sax bihêle wan pîva. Û Moabî, bûn qûlên ku xeracê didin Dawid.
3 Û gava Dawid, bona ku dîsa li ber çem serweriya xwe deyne diçû li Hedadezerê qiralê Tsoba yê lawê Rehobê xist. 4 Û Dawid, hezar û heft sed siwarî û bîst hezar peya ji wî sitend û Dawid hemû hespên erebeyê kûd kir, tenê bona sed erebeyê dest danî ser wan. 5 Û Sûriyeyiyên Şamî bona ku alîkariyê bi Hedadezerê qiralê Tsobayê re bikin hatin û Dawid li bîst û du hezarê Sûriyî xist. 6 Û Dawid leşkeran danî Sûriyeya Şamê û Sûriyî bûn qûlên ku xeracê didin Dawid. Û XUDAN, li her cîhê ku çû, Dawid xelas kir. 7 Û Dawid mertalên zêrîn ên ku li ser qûlên Hedadezer in rahişt û wan anî Orşelîmê. 8 Û qiral Dawid, ji Betah û Berotayê, ên ku bajarên Hedadezer in gellekî tûnc rahişt.
9 Û Toiyê qiralê Hamatê bihîst ku Dawid li hemûya artêşa Hedadezer xistiye 10 û Toî, lawê xwe Yoram, bona ku ji qiral Dawid re silavê bike û pîrozbahiya wî bike şand cem wî, ji ber ku Dawid bi Hedadezer re ceng danîbû û li wî xistibû; ji ber ku ceng di navbera Toî û Hedadezer de hebû. Û di destê Yoram de pertalên zîv û pertalên zêr û pertalên tûnc hebûn; 11 qiral Dawid van pertalana, tev zêr û zîvên ku ji hemû neteweyên ku girtine bin hukma xwe, 12 ji Sûriyeyê û ji Moabê û ji lawên Ammon û ji Filistiyan û ji Amalekiyan û yên ku ji talana Hedadezerê qiralê Tsoba, yê lawê Rehob bi sitendinê ve tirxan kiribû û ji XUDAN re tirxan kir.
13 Û Dawid, paşî ku ji lêxistina hîjdeh hezar Sûriyeyî[1], ên ku di Newala Xwê de li wan xistibûn vegeriya, navdar bû. 14 Û leşker danî Edomê; leşkeran danî hemûya Edomê û hemûyên Edomî ji Dawid re bûn qûl. Û XUDAN li her derên ku çû, Dawid xelas kir.

*Wezîfedarên Dawid*

15 Û Dawid li ser hemûya Îsraêlê qiraletiyê kir û Dawid darazî û dadiyê ji hemûya netewa xwe re pêk anî. 16 Û Yoabê lawê Serûya li ser serê artêşê bû û Yehoşafatê lawê

[1] An jî: Edomiyan.

Ahîlûd dîroknivîs bû 17 û Tsoda-
qê lawê Ahîtûb û Ahîmelekê lawê
Abîatar kahîn bûn û Seraya katib[1]
bû 18 û Benayayê lawê Yehoyada
li ser Keretiyan û Peletiyan bû û
lawên Dawid wezîr bûn.

*Qenciya ku Dawid ji Mefîboşet re dike*

9 Û Dawid got: Ma tu kesê ji mala
Saûl dijî hîn heye? Ez bona xa-
tirê Yonatan qenciyê ji wî re bikim.
2 Û qûlekî mala Saûl hebû û navê wî
Sîba bû û wî bangî cem Dawid kirin
û qiral jê re got: Sîba tu yî? Û wî
got: Qûlê te me. 3 Û qiral got: Ma ji
mala Saûl tu kes nema ku ez bona
Xwedê qenciyê jê re bikim? Û Sîba
ji qiral re got: Hîn lawekî Yonatan
heye, lingên wî kûd in. 4 Û qiral jê
re got: Ew li ku derê ye? Û Sîba ji
qiral re got: A vay, ew li Lo-Debarê
li mala Makîrê lawê Ammîel e. 5 Û
qiral Dawid şand û ji Lo-Debarê, ji
mala Makîrê lawê Ammîel wî da
anîn. 6 Û Mefîboşetê lawê Yona-
tanê lawê Saûl, hate cem Dawid û
bi ser dev re ket erdê û secde kir û
Dawid got: Mefîboşet! Û wî got: A
vay, ez qûlê te! 7 Û Dawid jê re got:
Metirse; ji ber ku ez ê bona xatirê
bavê te Yonatan, muheqeq qenciyê
bi te re bikim û hemû erdên bavê te
Saûl ez ê şunda vegerînim û bidim
te û tuyê her tim di sifra min de nan
bixwe. 8 Û xwar bû û got: Ma ez
qûlê te, çi me ku tuyê berê xwe bidî
kûçikekî mirî, yê mîna min?
9 Û qiral, bangî Sîbaya xizmetka-
ra Saûl kir û jê re got: Her tiştên
ku berê malên Saûl û hemû mala
wî bûn, dame lawê efendiyê te.
10 Û tu û hemûyên lawên te û
qûlên te, hûn ê bona wî erdê ba-
jon û tuyê zad bîne ku bila nanê
xwarinê yê lawê efendiyê te hebe;
lê belê Mefîboşetê lawê efendi-
yê te, dê her tim di sifra min de
nan bixwe. Û Panzdeh law û bîst
qûlên Sîba hebûn. 11 Û Sîba ji qi-
ral re got: Qûlê te, dê li gor her
tiştên ku efendiyê min qiral emirê
daye qûlê xwe bike. Û qiral got:
Lê Mefîboşet, dê mîna lawekî qi-
ral, di sifra min de bixwe. 12 Û
lawekî Mefîboşetî yê biçûk hebû
û navê wî Mîka bû. Û heçiyên
ku li mala Sîba rûdiniştin, qûlên
Mefîboşet bûn. 13 Û Mefîboşet li
Orşelîmê rûnişt; ji ber ku her tim
di sifra qiral de dixwar. Û ew ji
her du lingên xwe kûd bû.

*Dawid Ammonî û Aramiyan mexlûb dike*
1.Dîr 19

10 Û li pêy vê yekê wusa bû ku;
qiralê lawên Ammon mir û
lawê wî Hanûn li dêvla wî qirale-
tiyê kir. 2 Û Dawid got: Bavê wî
çawa ji min re qenciyê kiribe, ez jî
ji Hanûnê lawê Nahaş re qenciyê
bikim. Û Dawid, bi navdîtiya qûlên
xwe, ji ber bavê wî serxweşiyê

*1* Nivîsyar, nivîsevan.

jê re şand. Û qûlên Dawid hatin
welatê lawên Ammon. 3 Û serokên
lawên Ammon, ji efendiyê xwe
Hanûn re gotin: Ma tu dibêjî qey
Dawid, ji ber hurmeta ku ji bavê te
re dihêsiya van serxweşîgeran ji te
re şand? Ma şandina Dawid ku van
xulamana şandin, ne bona lêkolîna
bajêr, di derheqê wê de hînbûna
zanînê û bona xerakirina wê ye?
4 Û Hanûn bi qûlên Dawid ve girt
û nêviyê rîhên wan kur kir û kincên
wan, heta cîhê rûniştinê ji navê ve
jêkir û wan şand. 5 Û ji Dawid re
gîhandin û bona pêrgîniyê ji wan
re bikin, zilaman şandin; ji ber ku
ew zilamana zehf şerm dikirin.
Û qiral got: Heta ku rîha we der-
keve, li Erîhayê rûnin û wê gavê
vegerin.
6 Û lawên Ammon dîtin ku ji
Dawid re mekrûh in û lawên Am-
mon şandin û Sûriyeyiyên Beyt-
Rehobê û Sûriyeyiyên Tsoba, bîst
hezar leşkerê peya û tevî hezar
kesî qiralê Maaka û bi donzdeh
hezar kesên gelê Tobê bi pera ve
girtin. 7 Û Dawid bihîst û Yoab
û artêşa hemû egîdan şandin. 8 Û
lawên Ammon, li cîhê ku derke-
tin û ketina derî de bona cengê rêz
bûn û Sûriyeyiyên Tsoba û Rehob
û zilamên Tob û Maaka wekî din
li beyarê bûn.
9 Û gava Yoab dît ku ji pêşî û
paşiyê, berê cengê li dijî wî ye, ji
hemûyê zilamên bijartî yên Îsraêlê
cuda kir û wan li hember Sûriye-
yiyan rêz kir 10 û ji qewmê, yên
ku ji ber wan mane da destê birayê
xwe Abîşay û wan li hember lawên
Ammon ve rêz kir. 11 Û got: Ger
Sûriyî ji min xwurtir bin, wê gavê
tuyê alîkariyê bi min re bike û ger
lawên Ammon ji te xwurttir bin, wê
gavê ez ê alîkariyê bi te re bikim.
12 Mêrxas be û em bona netewa
xwe û bona bajarên Xwedayê xwe
egîdiyan bikin! û bila XUDAN,
tiştê ku di çavê wî de qenc e bike.
13 Û Yoab û netewa ku li cem wî
bû, bona ku bi Sûriyiyan re cengê
bikin, nêzîk bûn û ew ji ber Yoab
reviyan. 14 Û gava lawên Ammon
dîtin ku yên Sûriyeyî reviyane ew
jî ji ber Abîşay reviyan û ketin ba-
jêr. Yoab jî ji lawên Ammon vege-
riya û hate Orşelîmê.
15 Û gava Sûriyî dîtin ku li ber Îs-
raêlê xera bûn, li cem hev civiyan.
16 Û Hadadezer şand û Sûriyeyi-
yên ku li aliyê dinî çem in derxist
û serokê artêşa Hadadezer, Şobak,
li serê wan hatin Helamê. 17 Û ji
Dawid re hate gîhandin û hemûya
Îsraêlê civandin û ji Urdunê ve
derbas bûn û hatin Helamê. Û
Sûriyî li hember Dawid rêz bûn
û bi wî re cengê kirin. 18 Û yên
Sûriyî, ji ber Îsraêl ve reviyan û
Dawid ji yên Sûriyî heft sed ere-
be, tevî cengevanên wan çel hezar
siwarî qelihand û li serokê artêşê
Şobak xist û ew li wir mir. 19 Û

dema hemû qiralên ku qulên Ha-
dadezer in, dîtin ku li ber Îsraêlê
xera bûn, bi Îsraêlê ve aştiyê çêki-
rin û ji wan re qûlitiyê kirin. Û êdî
yên Sûriyî tirsiyan ku alîkariyê bi
lawên Ammon re bikin.

*Dawid, Bat-Şeba û kuştina Ûriya*

11 Û wusa bû ku, di salvegerê
de, di demsala ku qiral der-
dikevin seferê de, Dawid Yoab û
tevî wî qûlên xwe û hemûya Îs-
raêlê şand û lawên Ammon helaq
kirin û dorûbera Rabba girtin. Lê
belê Dawid li Orşelîmê ma.
2 Û êvarê wusa bû ku, Dawid ji
nav livînê xwe rabû û li ser xa-
niyê mala qiral ve digeriya û ji
ser xanî ve pîrekek xwe dişo dît
û lênihêrtina pîrekê zehf xweş
bû. 3 Û Dawid şand û di derheqê
pîrekê de pirsî. Û yekî got: Ma ev
pîreka ne jina Ûriyayê Hîttî û qîza
Elîamê Bat-Şebayî ye? 4 Û Da-
wid şandiyan şand û wê da anîn
û pîrek hate cem wî û ji ber ku ji
mindariya xwe hatiye paqij kirin,
Dawid pê re raket û pîrek vegeri-
ya mala xwe. 5 Û pîrek ducanî bû
û şand û ji Dawid re agahî kir: Ez
ducanî mam, got.
6 Û Dawid ji Yoab re şand û got:
Ûriyayê Hîttî ji min re bişîne. Û
Yoab Ûriya ji Dawid re şand. 7 Û
gava Ûriya gîhaşt cem Dawid, bi
gotinên: Yoab çawa ye û netewe
çawa ye û rewşa cengê çawa ye? jê
re pirsî. 8 Û Dawid ji Ûriya re got:
Dakeve mala xwe û lingên xwe
bişo. Û Ûriya ji mala qiral ve der-
ket û ji pêy wî xelata qiral derket.
9 Û Ûriya di deriyê mala qiral de
tevî hemû qûlên efendiyê xwe re
raket û daneket mala xwe. 10 Û bi
gotina: Ûriya daneket mala xwe ji
Dawid re gotin. Û Dawid ji Ûriya
re got: Ma tu ji rê nehatiye? Çima
tu daneket mala xwe? 11 Û Ûriya
ji Dawid re got: Sindoqa Peymanê
û Îsraêl û Cihûda di çadiran de rû-
dinin û çawa ku efendiyê min Yoab
û qûlên efendiyê min di çadiran de
kon danîne, ez bona ku bixwim, ve-
xwim û bi pîreka xwe re rakevim;
herim mala xwe? Bona mafê jiyana
te û bona mafê jiyana canê te ez ni-
karim ev tiştî bikim! 12 Û Dawid
ji Ûriya re got: Îro jî li vir bimîne,
ez ê sibê te bişînim. Û Ûriya ew roj
û dotira rojê li Orşelîmê ma. 13 Û
Dawid bangî wî kir û li ber wî xwar
û vexwar û wî serxweş kir û êvarê,
bona ku bi qûlên efendiyên xwe
re di cîhê xwe de rakeve derket û
daneket neçû mala xwe.
14 Û sibehê wusa bû ku, Dawid
nameyekê ji Yoab re nivîsand û
bi destê Ûriya ve şand. 15 Û di
nameyê de, bi vî awayî nivîsand:
Di cenga dijwar de Ûriya bixin
rêza pêşiyê û ji cem wî vekişin ku
bila bête lêxistin û bimire! 16 Û
wusa bû ku, dema Yoab bajêr di
bin dorpêçiyê de digirt Ûriya danî

cîhê ku dizanîbû zilamên egîd lê
ne. 17 Û zilamên bajêr derketin û
bi Yoab re cengê kirin û ji nete-
wê, ji nava qûlên Dawid hin kes
ketin û Ûriyayê Hîttî jî mir. 18 Û
Yoab şand û her tiştên ku di der-
heqê cengê de bûne, ji Dawid re
gîhand. 19 Û emir da şandî û got:
Dema te agahiya her tiştên di der-
heqê cengê de ji qiral re got û qe-
dandin, 20 dê wusa bibe, ger qiral
hêrs bibe û ji te re: Ma çima bona
ku li hemberê bajêr cengê bikin,
hûn ewqasî nêzîk bûn? Ma qey
we nizanîbûn ku dê ji ser dîwêr
ve bavêjin? 21 Û kî li Abîmelekê
lawê Yerûbbeşet xist? Ma ji ser
dîwêr, pîrekek kevirê destarê[1] nea-
vêt ser wî û ew li Tebetstê nemir?
Ma çima hûn ewqasî nêzîkî dîwar
bûn? bibêje, wê gavê tuyê: Qûlê
te Ûriyayê Hîttî jî mir bibêje.
22 Û şandî derket rê û hat û her
tiştên ku Yoab pê re şandibû
gîhand Dawid. 23 Û şandî ji Da-
wid re got: Ew zilaman ji me dij-
wartir derketin û li dijî me der-
ketin beyarê û me heta cîhê derî,
yê ku tê de dikevin hundir, wan
ajotin. 24 Û yên ku tîrê diavêtin, ji
jor ve avêtin ser qûlên te û ji qûlên
qiral, yên ku mirin çêbûn û qûlê
te Ûriyayê Hîttî jî mir. 25 Û Da-
wid ji şandî re got: Tuyê ji Yoab
re: Bila ev tişt di çavê te de bi xe-
rabî neyê xuya kirin, ji ber ku şûr
carna viya, carna jî wiya dixwe;
li dijî bajêr cengê dijwartir bike
û wê xera bike bibêje; dilawêriyê
bide wî.
26 Û pîreka Ûriya bihîst ku Ûriya
miriye û bona mêrê xwe bi xwe
ket û li xwe xist. 27 Û dema şîna
wê derbas bû, Dawid şand û wê
girt mala xwe û bû jina wî û la-
wekî jê re anî dinê. Lê belê, tiştê
ku Dawid çêkiribû, li ber XU-
DAN xerab bû.

*Natan Dawid diazirîne*

Zeb 51; 32

12 Û XUDAN Natan ji Dawid
re şand. Û dema hate cem
wî, jê re got: Li bajarekî, yekî dew-
lemend û yekî xizan, du zilam he-
bûn. 2 Gellek mîh û çêlekên zilamê
dewlemend hebûn 3 û yê zilamê
xizan jî, xeynî berxikek mê ya ku
sitendibû û xwedî kiribû, tiştekî
wî tune bû û berxik li cem wî, tevî
wî û zarokên wî mezin bûbû û ji
pariyê wî dixwar û ji tasa wî vedi-
xwar û di himbêza wî de radiket û
mîna qîza wî bû. 4 Û rêwiyek hate
cem zilamê dewlemend û bona ku
ji rêwiyê hatiye cem xwe re ama-
de bike, qêymîş nekir ku ji mîh û
çêlekên xwe rahêle, lê belê berxika
zilamê xizan rahişt û bona zilamê
ku dê were cem wî, wê amade kir.
5 Û li dijî wî zilamî, hêrsa Dawid
rabû û ji Natan re got: Bona mafê

[1] An jî: Aşê destan.

XUDANê ku zindî ye, zilamê ku
vêya kiriye, lawê mirinê ye 6 û ji
ber ku ev tiştî kiriye û heyfa wî lê
nehatiye, divê bi çar qatî heqê ber-
xikê bide!
7 Û Natan ji Dawid re got: Ew zi-
lama tu yî. Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN wusa dibêje: Min te li ser
Îsraêlê bi qiraletiyê mesh kir û te
ji destê Saûl xelas kir 8 û mala
efendiyê te dam te û jinên wî jî
dam himbêza te û Îsraêl û mala
Cihûda dam te û ger ev hindik bi-
hatiba, hîn min ê çi û çi bida te. 9
Ma çima te, ya di çavê XUDAN
de xerab e kir û gotina wî biçûk
dît? Te bi şûr li Ûriyayê Hîttî xist
û pîreka wî bi jinitî ji xwe re rahişt
û te bi şûrê lawên Ammon li Ûri-
ya xist. 10 Û niha, dê şûr abadîn ji
mala te veneqete, ji ber ku te min
biçûk dît û pîreka Ûriyayê Hîttî,
bi jinitî ji xwe re girt. 11 XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê ji mala te
li dijî te xerabiyê derxînim û ez
ê li ber çavên te jinên te rahêlim
û bidim cîranê te û dê li navrojê
ew bi jinên te re rakeve! 12 Ji ber
ku te bi dizîka kir, lê belê ez ê ev
tiştî, li ber çavên hemûya Îsraêlê û
li ber rojê çêbikim! 13 Û Dawid ji
Natan re got: Li hember XUDAN
sûcê kirim. Û Natan ji Dawid re
got: XUDAN jî sûcê te paqij kir;
tuyê nemire. 14 Lê te bi kirina vê
yekê, bû sedema ku neyarên XU-
DAN, wî biçûk bibînin. Ji ber vê
yekê lawê te yê ku biwelide dê
muheqeq bimire. 15 Û Natan çû
mala xwe.
Û XUDAN li zarokê ku ji jina
Ûriya ve bona Dawid hatiye dinê
xist û zarok zehf nexweş bû. 16 Û
Dawid bona zarok li Xwedê geri-
ya û Dawid rojiyê girt û ket hundir
û di tûmiya şevê de li erdê raket.
17 Û kalepîrên mala wî rabûn
û bona ku wî ji erdê ve rakin li
ber sekinîn; lê belê wî nexwest û
bi wan re xwarinê nexwar. 18 Û
roja heftemîn wusa bû ku; zarok
mir. Û qûlên Dawid tirsiyan ku jê
re mirina zarok bibêjin; ji ber ku
gotin: A vay, gava zarok zindî bû
me jê re gotin, gotina me guhdarî
nekir; ma em çawa bibêjin zarok
miriye? Dê xesarekê bide xwe.
19 Û Dawid pistûkusta qûlên xwe
dît û Dawid fêhm kir ku zarok
miriye û Dawid ji qûlên xwe re:
Zarok miriye? got. Û: Mir gotin.
20 Û Dawid ji erdê ve rabû û xwe
şuşt û rûn di xwe de da û kincê
xwe guhert û ket mala XUDAN û
secde kir û hate mala xwe û gava
xwarinê xwest, danîn ber û xwar.
21 Û qûlên wî jê re gotin: Ma ev
kirina te çî ye? Gava zarok zindî
bû te bona wî rojiyê girt û tu giriya
û gava zarok mir, tu rabû û te nan
xwar. 22 Û wî got: Gava hîn zarok
zindî bû, rojiyê girtim û giriyam;
ji ber ku: Kî dizanî, dibe ku XU-
DAN xêrê bi min re bike û zarok

bijî gotim. 23 Lê belê niha mir, ma
ez ê çima rojiyê bigirim? Ma êdî
qey ez dikarim wî şunda bînim?
Ez ê herim cem wî, lê belê ew ê
venegere cem min.
24 Û Dawid xemrevîniyê li pîre-
ka xwe Bat-Şeba re kir û ket cem
wê û pê re raket û pîrek lawekî anî
dinê û navê Silêman lê kir. Û XU-
DAN ji wî hez kir 25 û bi destê
peyxamber Natan şand û di oxra
XUDAN de navê Yedîdya[1] lê kir.
26 Û Yoab li dijî bajarê Rabba, yê
lawên Ammon cengê kir û bajarê
qiral bi dest ve xist. 27 Û Yoab
şandiyan ji Dawid re şand û got: Li
hember Rabbayê cengê kirim; him
jî bajarê avan sitendim. 28 Û niha
yên ji ber netewê ve mane bicivî-
ne û li dijî bajêr artêşgehê deyne û
wê bigire ku ez nestînim û bila bi
navê min ve neyê bang kirin. 29 Û
Dawid hemûya netewê civand û çû
Rabbayê û li hember wê cengê kir
û wê bi dest ve xist.
30 Û taca qiralên wan ji serê wî
ve rahişt û giraniya wê, talentek[2]
zêr bû û di wê de kevirê biqîmet
hebû û li ser serê Dawid ve hate
danîn û ji bajêr ve gellek malê
talanê derxist. 31 Û netewa ku tê
de ye derxist û wan xist xîzaran,
çartilên hesin û bivirên hesin û di
firna tûleyan de da şuxulandin û
ji hemû bajarên lawên Ammon ve
wusa kir. Û Dawid û hemû nete-
we vegeriyan Orşelîmê.

*Amnon û Tamar*

13 Û li pêy vêya, wusa bû
ku, xwuşkek xweşik ya
Abşalomê lawê Dawid hebû û
navê wê Tamar bû û Amnonê lawê
Dawid, zehf jê hez kir. 2 Û Am-
non, qasî ku di oxra wê de nexweş
bikeve ji bo xwuşka xwe Tamar
kesirî; ji ber ku qîza ku hîn bakî-
re bû û di çavê Amnon de, tiştekî
bi wê kirin dijwar hate xuya kirin.
3 Û hevalekî Amnon bi navê Yo-
nadab hebû, lawê Şîmeayê birayê
Dawid bû. Û Yonadab zilamekî
zehf baqil bû. 4 Û jê re got: Ya
lawê qiral, ma çima tu wusa roj
bi rojê lawaz dikevî? Gelo tuyê ji
min re nebêjî? Û Amnon jê re got:
Ez ji Tamara xwuşka birayê xwe
Abşalom ve hez dikim. 5 Û Yona-
dab jê re got: Bikeve nava livînên
xwe û xwe nexweş bide xuya ki-
rin û dema ku bavê te were û te
bibîne jê re bibêje: Ez rica dikim,
bila xwuşka min Tamar were û
nan bi min ve bide xwarin, bila li
ber çavê min xwarinê amade bike
ku, ez kirina wê bibînim û ji destê
wê ve bixwim. 6 Û Amnon raket
û xwe nexweş da xuyanî kirin û
dema qiral hate ku wî bibîne, Am-
non ji qiral re got: Ez rica dikim,

[1] Delalê, an jî: Xoşewîstê XUDAN.

[2] Li rasteka menan binêrin.

bila xwuşka min Tamar were û li
ber çavê min du pîdeyî çêbike ku
ez ji destê wê bixwim.
7 Û Dawid şand malê û ji Tamarê
re got: Niha here mala birayê xwe
Amnon û jê re xwarinê amade bike.
8 Û Tamar çû mala birayê xwe
Amnon û ew radiket. Û Tamarê
hevîr girt û sitirand û li ber çavên
wî pîdeyan çêkir û pîdeyan pijand.
9 Û miqilkê rahişt û li ber wî vala
kir, lê belê ew, nexwest ku bixwe.
Û Amnon got: Her kesî ji cem min
derxînin! Û hemû ji cem wî derke-
tin. 10 Û Amnon ji Tamarê re got:
Xwarinê bîne odê ku ez ji destê
te bixwim. Û Tamarê pîdeyên ku
çêkiribû rahiştin û anî odê, ji bi-
rayê xwe Amnon re. 11 Û dema ku
wana, bona bixwe anî cem, pê girt
û jê re got: Were bi min re rakeve,
xwuşka min! 12 Û jê re got: Na
birayê min, min nizm meke! ji ber
ku di Îsraêlê de, tiştekî wusa nabe;
vê dînitiya meke! 13 Û ma ez ê vê
şermezariya xwe bibim ku derê? Û
tuyê li Îsraêlê, bibe yekî mîna dîn-
an. Û niha ez rica dikim, ji qiral re
bibêje; ji ber ku min ji te naparêze.
14 Lê belê nexwest ku gotina wê
guhdarî bike û ji ber ku jê xwurttir
bû, wê nizm kir û pê re raket.
15 Wê gavê Amnon zehf jê ke-
rihî; wusa ku, kerihandina jê di-
kerihî, ji hezkirina wî zêdetir bû.
Û Amnon jê re got: Rabe, here!
16 Lê belê wê ji wî re got: Na! Ji
ber xerabiya ku tu bi qewirandi-
na min ji min re dikî, ji xerabiya
dinî te bi min kiriye hîn jî me-
zintir e. Lê belê nexwest ku wê
guhdarî bike. 17 Û bangî xulamê
xwe, yê ku xizmetê jê re dike kir
û got: Vêya ji cem min derxîne û
li pêy wê derî çilmêre bike! 18 Û
fîstanek belek li ser keçikê hebû,
ji ber ku qîzên qiral, ên ku neçûne
mêr kincên wusa li xwe dikirin.
Û xizmetkar wê derxist derve û
li pêy wê derî çilmêre kir. 19 Û
Tamarê xwelî li serê xwe rijand
û fîstanê belekê ku lê bû çirand
û destê xwe danî serê xwe çû û
gava diçû diqêriya.
20 Û birayê wê Abşalom jê re
got: Ma birayê te Amnon bi te re
bû? Û niha xwuşka min, hiş be;
ew birayê te ye; vî tiştî nexe dilê
xwe! Û Tamar li mala birayê xwe
Abşalom, bi keser rûniştîbû. 21 Û
dema qiral Dawid, hemûyên van
tiştan bihîst, zehf hêrs bû. 22 Û
Abşalom qenc an jî xerab, tu tiştî
ji Amnon re negot; ji ber, bona ku
xwuşka wî Tamar nizm kiribû,
Abşalom ji Amnon ve kerihî.

*Abşalom Amnon dikuje*

23 Û bêkêmasî paşî du salî, li
Baal-Hatsora ku li cem Efrayîm e,
hevringvanên mîhan yên Abşalom
hebûn û Abşalom bangî hemû
lawên qiral kir. 24 Û Abşalom
hate cem qiral û got: A vay, hev-

ringvanên mîhan yên vî qûlê te
hene; ez rica dikim, bila qiral û
qûlên xwe bi vî qûlên te re herin.
25 Û qiral ji Abşalom re got: Na
lawê min, em hemû nerin û ji te
re nebin giranî. Û zorê da wî, lê
belê nexwest ku here û wî pîroz
kir. 26 Û Abşalom got: Balo bila
birayê min Amnon bi me re here!
Û qiral jê re got: Ma çima dê bi
te re here? 27 Û Abşalom zorê da
wî û Amnon û hemû lawên qiral
pê re şandin. 28 Û Abşalom emir
da xulamên xwe û ji wan re got:
Binêrin, gava dilê Amnon bi xem-
rê ve xweş bibe, ez ê ji we re: Li
Amnon bixin! bibêjim, wê çaxê
wî bukujin; metirsin! Ma yê ku
emir daye we ne ez im? Dilawêr
bin û mêrxas bin! 29 Û xulamên
Abşalom, mîna ku Abşalom
emirê dabû li Amnon kirin. Û
hemû lawên qiral rabûn û her yek
li qantirê xwe siwar bû û reviyan.
30 Û wusa bû ku, dema ew di
rê de bûn, bi gotina: Abşalom li
hemûyên lawên qiral xist û ji wan
tu kes neman, agahî[1] ji Dawid re
hat. 31 Û qiral rabû û kincê xwe
çirand û li erdê ve raket û hemû
qûlên wî, bi kincên xwe yî çiri-
yayî, li cem wî sekinîbûn. 32 Û
Yonadabê lawê Şîmeayê birayê
Dawid bersivê da û got: Bila
efendiyê min nebêje ku qey hemû
xortan, lawên Dawid kuştine; ji
ber ku tenê Amnon miriye; ji ber
ku, ji roja ku xwuşka xwe Tamar
nizm kiriye, biryara ev tiştî bi
destê Abşalom ve hatiye dayîn.
33 Û bila efendiyê min qiral, niha
bi gotina: Hemû lawên wî mirine
nexe dilê xwe, ji ber ku tenê Am-
non miriye.
34 Û Abşalom reviya û xulamê
nobedar çavên xwe rakir û nihêrt
û a vay, ji rêgeha paşîn, ji berwa-
ra çiyê ve ajaweyek mezin dihat.
35 Û Yonadab ji qiral re got: A
vay, lawên qiral tên; qûlê te çawa
gotibe wusa ye. 36 Û wusa bû
ku, dema axaftinê qedand, a vay,
lawên qiral hatin û bi dengê bilind
giriyan û qiral û hemû qûlên wî jî
zehf giriyan.
37 Û Abşalom reviya û çû cem
Talmayê qiralê Geşûrê, yê lawê
Ammîhûr. Û Dawid bona lawê
xwe, her roj şînê dikişand. 38 Û
Abşalom reviya û çû Geşûrê û
sê sal li wir ma. 39 Û canê qiral
Dawid dixwest ku derkeve cem
Abşalom; ji ber, bona ku Amnon
miribû, di derheqê wî de xemre-
vîniyê didît.

*Abşalom vedigere Orşelîmê*

14 Û Yoabê lawê Serûya, fêhm
kir ku dilê qiral di Abşalom
de ye. 2 Û Yoab şand Tekoa û ji
wir pîrekek baqil da anîn û jê re
got: Ez rica dikim, xwe bi şîn bide

[1] Nûçe.

xuya kirin û ez rica dikim, kincê
şînê li xwe bike û rûn di xwe nede
û gellek rojan bibe mîna pîreka ku
bona mirî şînê dikişîne 3 û here
cem qiral û jê re bibêje. Û Yoab,
dê tiştê ku bibêje hînî wê kir.
4 Û pîreka Tekoayî ji qiral re got
û bi ser rû xwe avêt erdê û secde
kir û got: Min xelas bike ya qiral!
5 Û qiral jê re got: Çiyî te heye? Û
pîrekê got: Bi rastî ez jinebiyek im
û mêrê min miriye. 6 Û du lawên
cariya te hebûn û her du li beya-
rê pev çinîn û yê ku wan veqetî-
ne tunebû û yekî li yê din xist û
wî kuşt. 7 Û a vay, hemû eşîr, li
hemberî cariya te rabûn û: Ka yê
ku birayê xwe kuştiye bide ku em
di berdêla canê birayê wî de, canê
wî bistînin, yê ku mêrasxwer jî
helaq bikin! dibêjin. Û dê pizotê
minî li pêy maye bitefînin û dê ji
mêrê min re, di rûyê erdê de nav û
kesî ku li pêy bimîne nehêlin.
8 Û qiral ji pîrekê re got: Here
mala xwe û ez ê di derheqê te de
emir bidim. 9 Û pîreka Tekoayî ji
qiral re got: Efendiyê min qiral;
bila neheqî li ser min û li mala
bavê min be û qiral û textê wî
bona wê bêsûc bin! 10 Û qiral
got: Her kî tiştekî ji te re bibêjî,
wî bîne cem min û êdî ew nika-
re dest bi te de. 11 Û pîrekê got:
Ez rica dikim, bila qiral Xwedê,
XUDAN di bîra xwe de bîne û
êdî yê ku tola xwînê hildide bila
xerabe neke, ya na dê lawê min
helaq bikin! Û wî got: Bona mafê
XUDANê ku zindî ye, dê mûyek
ji serê lawê te nekeve erdê!
12 Û pîrekê got: Ez rica dikim, bila
cariya te ji efendiyê min qiral re
gotinekê bibêje! Û wî: Bibêje! got.
13 Û pîrekê got: Wê gavê çima te
tiştekî wusa li dijî netewa Xwedê
pêk anî? Ji ber ku qiral bi axaftina
vê gotinê dibe mîna zilamekî bisûc,
ji ber ku qiral, zilamê ku qewiran-
diye, şunda nîne. 14 Ji ber ku mu-
heqeq em ê bimirin û em mîna ava
ku bi erdê ve dirije û nayê berhev
kirin; Xwedê jî canê nakişîne û ra-
nahêle û bona zilamê ku qewiran-
diye, jê ve dûr neyê avêtin, li çare-
serkirinan difikire. 15 Niha ji qiral
re bibêjim; dibe ku qiral gotina
cariya xwe dike; 16 ji ber ku bona
cariya wî û lawê wê ji destên yên
ku dixwazin wan ji mêrasa Xwedê
ve jêkin û bavêjin xelas bikî, dê qi-
ral guhdarî bike. 17 Û cariya te got:
Ez rica dikim, bila gotina efendiyê
min qiral aramiyê bide; ji ber ku di
fêhm kirina qencî û xerabiyê de,
milyaketê Xwedê çi be, efendiyê
min qiral jî wusa ye û bila Xwe-
dayê te XUDAN bi te re be! 18 Û
qiral bersivê da û ji pîrekê re got:
Tiştê ku ez ê ji te bipirsim, ji min
veneşêre! Û pîrekê got: Bila efen-
diyê min qiral niha bibêje! 19 Û
qiral got: Di hemûya vêya de, destê
Yoab bi te re yî? Û pîrekê bersivê

da û got: Efendiyê min qiral, bona
mafê jiyana canê te, ji tiştekî ku qi-
ral gotiye kes nikare bi çepê an jî
rastê ve bizivire! ji ber ku qûlê te
Yoab, wî emir da min û hemû van
gotinan hînî cariya te kir; 20 qûlê te
Yoab, bona ku wecê kar biguherî-
ne vî tiştî kir û efendiyê min li gor
zanîna milyaketê Xwedê, bi zanîna
her tiştên ku li dinê dibin, baqil e.
21 Û qiral ji Yoab re got: A vay,
niha ev tiştî kirim; bona vê yekê
here wî xortî, Abşalom şunda bîne.
22 Û Yoab bi ser rûyê xwe ve ket
erdê û secde kir û qiral pîroz kir û
Yoab got: Efendiyê min qiral, ev
qûlê te dizane ku îro di çavê te de
xêrê dîtime, ji ber ku qiral, gotina
vî qûlê xwe anî cîh. 23 Û Yoab
rabû û çû Geşûrê û Abşalom anî
Orşelîmê. 24 Û qiral got: Bila ve-
gere mala xwe, lê belê wecê min
nebîne. Û Abşalom vegeriya mala
xwe û wecê qiral nedît.
25 Û di hemûya Îsraêlê de, yekî
ku qasî Abşalom pesnahiya xweşi-
kayiya wî bête dayîn tune bû. Ji
pahniya lingê wî heta ser serê wî,
di wî de qisûr tune bû. 26 Û gava
porê serê xwe jê dikir – û di dawi-
ya her salê de jê dikir; ji ber ku pê
giran dihat, wê jêdikir –, porê serê
xwe, bi wezna qiral du sed şekel[1]
diwezinand. 27 Û sê law û qîzek
ji Abşalom re hatin dinê û navê
qîzikê Tamar bû; pîrekek lênêrîn
xweşik bû.
28 Û Abşalom, bêkêmasî du sal li
Orşelîmê rûnişt û wecê qiral nedît.
29 Û Abşalom, bona ku Yoab bişîne
cem qiral jê re zilam şand û ew ne-
xwest ku here cem û cara duwemîn
dîsa şand û nexwest ku were. 30 Û
ji qûlên xwe re got: Binêrin, zeviya
Yoab nêzîkî ya min e û li wir cehê
wî heye; herin û agir pê bixin! Û
qûlên Abşalom agir bi zeviyê ve
xistin. 31 Û Yoab rabû û hat cem
Abşalom, mala wî û jê re got: Ma
çima qûlên te agir bi zeviya min
ve xistin? 32 Û Abşalom ji Yoab re
got: A vay, ji te re şandim û gotim:
Were vir û ez bi gotina: Ma çima
ez ji Geşûrê hatim? Ez hîn li wir
ba ma, dê bona min qenctir biba te
bişînim cem qiral. Û niha ez wecê
qiral bibînim û ger di min de fesadî
hebe, bila min bukuje! 33 Û Yoab
hat cem qiral û jê re gîhand û bangî
Abşalom kir û hate cem qiral û li
ber qiral, bi ser rû bi erdê ve xwar
bû û qiral Abşalom ramûsand.

### *Abşalom li dijî Dawid serîhildide*

1.Qir 1,5-26

15 Û li pêy vêya wusa bû ku,
Abşalom bona xwe erebe-
yek û hespan û bona ku li pêşiya
wî baz bidin pêncî zilam amade
kir. 2 Abşalom zû radibû û li qera-
xa rêya derî disekinî û wusa dibû
ku, Abşalom, her zilamê ku bona

[1] Li rasteka menan binêrin.

daraziyê doza wî ji qiral re dibin,
bangî cem xwe dikir û: Tu ji kî-
jan bajêrî yî? digot. Û ew: Qûlê
te ji eşîrekî Îsraêlê ye digot. 3 Û
Abşalom jê re digot: Binêre, karên
te qenc û rast in; lê belê ji aliyê qi-
ral, kesek ku te guhdarî bike nîne.
4 Û Abşalom digot: Xwezî li welêt
min bi darazkirî deynin û her zi-
lamê ku daraziya wî an jî doza wî
hebe bihata cem min û min dadi-
yê bi wî re bikira! 5 Û wusa dibû
ku, dema zilamekî bona xwar bibe
berbi wî dihat, destê xwe dirêj di-
kir, bi wî digirt û ramûsandinê li
wî dikir. 6 Û ji hemûya Îsraêli-
yên ku bona daraziyê dihatin cem
qiral re, Abşalom wusa dikir û
Abşalom dilê zilamên Îsraêlê dizî.
7 Û li pêy çel[1] salî wusa bû ku,
Abşalom ji qiral re got: Ez rica
dikim ez herim û qewla ku ji XU-
DAN re qewl kiribûm, li Heb-
ronê bidim. 8 Ji ber ku qûlê te:
Bi rastî, ger XUDAN min şunda
bîne Orşelîmê, bona ku qûlitiyê ji
XUDAN re bikim, hîn dema ez li
Sûriyê, li Geşûrê rûdiniştim, bo-
raq danîbûm. 9 Û qiral jê re got:
Bi xweşiyê here! Û ew rabû û çû
Hebronê. 10 Û Abşalom sîxuran ji
hemû eşîrên Îsraêlê re şand û got:
Dema hûn dengê boriyan bibihî-
zin, hûn: Abşalom li Hebronê bû
qiral! bibêjin. 11 Û du sed kesên
ku ji Orşelîmê hatibûn bang kirin,
tevî Abşalom çûn û ew bi dilekî
paqij diçûn û bi tiştekî nizanîbûn.
12 Û gava Abşalom qurbanên xwe
pêşkêş dikir, şîretkerê Dawid Ahî-
tofelê Gîloyî ji bajarê wî, ji Gîloyê
da anîn. Û civata fesadiyê xwurt
bû; ji ber, netewa ku bi Abşalom
re bûn, her ku diçû zêde dibûn.

*Reva Dawid, dost û dijminên wî*
Zeb 3

13 Û zilamekî agahiyê gîhand Da-
wid hat û got: Dilê zilamên Îsraêlê,
li pêy Abşalom in. 14 Û Dawid li
Orşelîmê, ji hemû qûlên xwe, ên
ku li cem wî bûn re got: Rabin û
em birevin; ya na dê kesê ku ji ber
Abşalom bireve û xelas bibe tune
be; bona çûnê lez bikin, ya na dê
zû bigihêje me û asîwê bîne serê
me û bajêr jî bide ber şûrê xwe!
15 Û qûlên qiral ji qiral re gotin:
Ecibandina efendiyê me qiral her
çi be, a vay, em qûlê te ne! 16 Û
qiral û li pêy wî hemûya maliyên
wî derketin. Û qiral, ji cariyeyan
deh pîrekî, bona ku li benda malê
bin sekinandin. 17 Û qiral û li pêy
wî hemûya netewê derketin û li
Beyt-Merhakê sekinîn. 18 Û hemû
qûlên wî ji cem wî derbas bûn û
hemûyên Keretiyan û hemûyên
Peletiyan û hemûyên Gatiyan û
şeş sed kesên ku ji Gatê, li pêy wî
hatine, ji ber qiral derbas bûn.
19 Û qiral ji Îttayê Gatî re got: Ma

---
1 Di hinek nivîsan de çar.

çima tu jî bi me re diçe? Vegere û
bi qiral re bimîne; ji ber ku tu bi-
yan î û zilamekî ku ji welatê xwe
ve hatiye ajotin î; vegere cîhê xwe!
20 Hîn doh tu hat; ma îroj ez te
bi me re bigerînim? Ez bikaribim
herim ku derê, ez ê herim. Vege-
re û birayên xwe jî vegerîne; bila
xêr û rastî bi te re bin! 21 Û Îttay
bersivê da qiral û got: Bona mafê
XUDANê ku zindî ye û bona mafê
jiyana efendiyê min qiral, efendiyê
min qiral li ku derê be, muheqeq ev
qûlê te jî dixwaze bila bona mirinê
bibe, an jî bona jiyanê bibe, dê li
wir be! 22 Û Dawid ji Îtta re got:
Bimeşe û derbas bibe! Û Îttayê
Gatî û hemû zilamên wî û hemû
zarokên ku li cem wan bûn, derbas
bûn. 23 Û hemûya welêt, bi dengê
bilind digiriyan û hemûya netewê
derbas bûn û qiral jî geliyê Kîdronê
derbas bû û hemûya netewê, berbi
rêya çolê ve derbas bûn.
24 Û a vay, Tsadok jî bi hemû
Lêwiyiyên ku Sindoqa Peymanê
ya Xwedê dikişînin re hat û Sin-
doqa Xwedê danîn erdê û heta
hemûya netewe bitûmî ji bajêr ve
derbas bû, Abîatar derket cîhekî
bilind. 25 Û qiral ji Tsadok re got:
Sindoqa Xwedê vegerîne bajêr;
ger ez di çavê XUDAN de xêrê bi-
bînim, dê min şunda bîne û dê wê
û şunwara xwe rê min bide; 26 lê
belê ger: Ez ji te ne razî me bibêje;
a vay ez, bila yê ku di çavê xwe de
qenc e ji min re bike. 27 Û qiral ji
kahîn Tsadok re got: Ma tu ne yê
ku Dibîne yî? Tu û lawê xwe Ahî-
maats û Yonatanê lawê Abîatar,
tevî we bi her du lawên xwe re, bi
xweşiyê vegerin bajêr. 28 Binêrin,
heta ku ji we gotinek ku qala rewşê
dike were, ez ê di bihurkên çolê de
bisekinim. 29 Û Tsadok û Abîa-
tar Sindoqa Xwedê şunda birin
Orşelîmê; li wir man.
30 Û Dawid ji kaşa çiyayê Zeytûnê
ve hildikişiya û dema hildikişiya
digiriya û serê wî nuxumandî bû û
pêxas dimeşiya û hemû neteweya
ku pê re ne, her kes serê xwe nu-
xumandibûn û hildikişiyan û dema
hildikişiyan digiriyan. 31 Û di wê
navberê de yekî ji Dawid re bi go-
tina: Ahîtofel di nava kuştîxwazên
ku alîkirê Abşalom de ye têgîhand.
Li ser vêya Dawid got: Ya XU-
DAN, şîretên Ahîtofel vala derxî-
ne! 32 Û wusa bû ku; dema Dawid
hat serê gira ku ji Xwedê re lê sec-
de tête kirin, a vay, Hûşayê Arkî,
bi avayekî kincê wî çiriyayî û li ser
serê wî ax hebûnê, hate pêrgîniya
Dawid. 33 Û Dawid jê re got: Ger
tu bi min re derbas bibe, tuyê ji min
re bibe bar; 34 lê belê ger tu vegere
bajêr û ji Abşalom re: Ya qiral, ez ê
bibim qûlê te; di derbasiyê de çawa
ez bûbûm qûlê bavê te, niha jî ez ê
bibim qûlê te bibêje, wê gavê tuyê
bona min şîreta Ahîtofel xera bike.
35 Û kahîn Tsadok û kahîn Abîa-

tar li wir ne bi te re ne? Û dê wusa
bibe ku tuyê her tiştê ku ji mala
qiral ve bibihîze, bighîne kahîn
Tsadok û kahîn Abîatar. 36 A vay,
li wir, li cem wan du lawên wan;
Ahîmaatsê lawê Tsadok û Yona-
tanê lawê Abîatar hene û hûn ê her
tiştên ku bibihîzin, bi destê wan ji
min re bişînin. 37 Û Hûşayê heval-
bendê Dawid, ket bajêr; Abşalom
jî ket Orşelîmê.

*Dawid û Sîba*

16 Û gava Dawid, serê kaşê
hinekî derbas kir, a vay,
Sîbayê xizmetkarê Mefîboşet e,
bi du sed nan û sed goşî mewîj û
sed mêwa havînê û cotek kerên
bi cilik lê ne û hebanên xemrê
lê ne, hate pêşiya wî. 2 Û qiral
ji Sîba re got: Ma tuyê vana çi
bikî? Û Sîba got: Ker, bona ma-
liyên qiral li wan siwar bibin û
nan û mêwa havînê bona ku xu-
lam bixwin û xemr jî, bona ku li
çolê yên westayî vexwin in. 3 Û
qiral got: Lawê efendiyê te li ku
ye? Û Sîba ji qiral re got: A vay,
li Orşelîmê ma; ji ber ku: Dê îro
mala Îsraêlê, qiraletiya bavê min
bidin min! got. 4 Û qiral ji Sîba re
got: A vay, her tiştê Mefîboşet yê
te ne. Û Sîba got: Ez axa lingên
we me, efendiyê min qiral, ez di
çavê te de xêrê bibînim! 5 Û qi-
ral Dawid hate Bahûrîmê û a vay,
li wir zilamek ji eşîra mala Saûl
ve derket û navê wî Şîmeiyê lawê
Gera bû; derket û gava derdiket,
naletê dixwend.

*Dawid û Şîmeî*

6 Û kevir diavêt Dawid û hemû
qûlên Dawid û hemû netewe û
hemûyên egîdan li rast û çepê Da-
wid bûn. 7 Û gava Şîmeî naletê di-
kir, wusa digot: Derkeve, derkeve
ya zilamê bi xwîn û zilamê nizm[1]!
8 XUDAN, hemû xwîna mala Saûl,
ê ku tu li dêvla wî bû qiral, bi ser te
ve vergerand û XUDAN qiraletiyê
da destê lawê te Abşalom û a vay,
tu di xerabiya xwe de hate girtin, ji
ber ku tu zilamekî dest bi xwîn e!
9 Û Abîşayê lawê Serûya ji qiral
re got: Ma çima dê ev kûçikê mirî
naletê li efendiyê min qiral bike?
Ez rica dikim, ez derbas bibim û
serê wî jêbikim! 10 Û qiral got:
Ya lawên Serûya, ma çiyî min ji
we re? Madem ku naletê dike û
madem ku XUDAN: Ji Dawid re
naletê bike! gotiye, wê gavê kî dê:
Ma çima te wusa kir, bibêje? 11 Û
Dawid ji Abîşay re û ji hemû qûlên
xwe re got: A vay, lawê min ê ku ji
nîjada min e dema li canê min bi-
gere, ma niha vayê Benyamînî ni-
kare zêdetirê wê bike? Wî berdin
û bila naletê bike; ji ber ku XU-
DAN emir daye wî. 12 Dibe ku
XUDAN li neheqiya ku ji min re

1 Rezîl, an jî: Nemerd.

hatiye kirin binêre û li dêvla naleta
ku îro wî kirine, XUDAN bi qen-
ciyê berdêla wan bide. 13 Û Da-
wid û zilamên xwe di rê de diçûn
û Şîmeî li hember wî, ji berwariya
çiyê ve diçû û dema diçû naletê
dikir û kevir diavêt wî û axê dia-
vêtê. 14 Û qiral û hemû netewa ku
li cem in westayî gîhaştin û li wir
rawestiya.
15 Û Abşalom û hemûya netewê,
zilamên Îsraêl hatin Orşelîmê û
Ahîtofel bi wî re bû. 16 Û wusa
bû ku hevalbendê Dawid, Hûşayê
Arkî hate cem Abşalom û Hûşay ji
Abşalom re got: Bijî qiral! Bijî qi-
ral! 17 Û Abşalom ji Hûşay re got:
Ma ji hevalê te re qenciya te ev e?
Çima tu bi hevalê xwe re neçû?
18 Û Hûşay ji Abşalom re got:
Na; lê belê ez ê bibim yê zilamê
ku XUDAN û ev netewa û hemû
zilamên Îsraêlê wî bijartine û ez ê
bi wî re bimînim. 19 Û ya din, ma
ez ê ji kê re xizmetê bikim? Ma
ne li ber lawê wî? Çawa ku li ber
bavê wî xizmetê kiribim, dê li ber
te jî wusa bibim.
20 Û Abşalom ji Ahîtofel re got:
Ka şîreta xwe bidin, em çi bikin?
21 Û Ahîtofel ji Abşalom re got:
Here cem cariyên ku bavê te wan
bona li benda malê bimînin da-
niye û dê hemû Îsraêl bibihîzin
ku tu ji bavê xwe re mekrûh î û
dê destên hemûyên ku bi te re ne
xwurt bibin! 22 Û li ser xanî bona
Abşalom çadirê danîn û li ber ça-
vên hemûya Îsraêlê Abşalom ket
cem cariyeyên bavê xwe. 23 Û
şîreta ku di wan rojan de Ahîtofel
dabû, mîna ya zilamê ku li Go-
tina Xwedê dipirse bû; her şîreta
Ahîtofel, bona Dawid jî bona
Abşalom jî wusa bû.

*Hûşay şîreta Ahîtofel xera dike*

17 Û Ahîtofel ji Abşalom re
got: Niha ez donzdeh hezar
kesî hilbijêrim û rabim, îşev bera
pêy Dawid bidim 2 û hîn ku ew
westayî û destên wî lawaz in ez
ê êrîşî ser bikim û wî bitirsînim û
dê hemû netewa ku li cem in bi-
revin û ez ê tenê li qiral bixinim
3 û hemûya netewê ji te re şûnda
bînim; lêxistina zilamê ku tu lê di-
gerî, vegera hemûya netewê yî û
dê hemûya netewê di xweşiyê de
bin. 4 Û ev gotin di çavê Abşalom
û di çavên hemû kalepîrên Îsraêlê
de rast hate xuya kirin.
5 Û Abşalom got: Niha bangî
Hûşayê Arkî bike, em tiştên ku
dê ew ê bibêje jî guhdarî bikin!
6 Û Hûşay hate cem Abşalom û
Abşalom pê re axifî û got: Ahîto-
fel wusa got; gelo em li gor go-
tinên wî bikin? Ya na, tu bibêje!
7 Û Hûşay ji Abşalom re got: Ev
şîreta ku Ahîtofel vê carê daye ne
qenc e! 8 Û Hûşay got: Tu dizanî
ku bavê te û zilamên wî qehreman
in û mîna hirçê ku li beyarê ji çêli-

kên xwe dûr ketiye zilamên canên
wan şewitiye ne û bavê te zilamê
cengê ye û tevî netewê di derekê
de şevê naborîne. 9 A vay, niha
ew di wan kortikan yekî de, an jî
di derekî din de xwe veşartiye û
dê wusa bibe ku dema di destpêkê
de yê ji vana bikeve bibe, her yê
ku bibihîze, dê bibêje: Şikestin
di netewa ku li pêy Abşalom ve
diçin de hene! 10 Lawê egîdê ku
dilê wî mîna dilê şêr e jî dê bitûmî
buhule; ji ber, hemûya Îsraêlê
dizane ku, bavê te qehreman e û
yên ku pê re ne zilamên mêrxas
in. 11 Lê belê ez bi vî awayî şîretê
didim: Ji Danê heta Beer-Şebayê
hemûya Îsraêl, bi pirranî mîna
qûma li qeraxa behrê ne bila li
cem te bicivin û tu bi xwe biçe
cengê. 12 Û li cîhekî ku dê lê be,
em ê werin ser wî û mîna ku xu-
nav bikeve erdê em ê bi ser wî ve
bikevin û em ê wî û ji zilamên
ku pê re ne, yekî jî bernedin.
13 Û ger ew vekişiyabe bajarekî,
dê wê gavê hemûya Îsraêlê benan
bînin wî bajarî û heta ku di cîhê
wê de kevirek biçûk jî nemînî,
em ê wê bikişînin newalê. 14 Û
Abşalom û hemû zilamên Îsraêlê
gotin: Şîreta Hûşayê Arkî, ji şîreta
Ahîtofel qenctir e. Ji ber, bona ku
XUDAN xerabiyê bi ser Abşalom
ve bîne, xera kirina şîreta Ahîtofel
ya qenc, XUDAN rêz kiribû.
15 Û Hûşay; ji kahînan Tsadok
û Abîatar re got: Ahîtofel, bi vî
awayî şîretê da Abşalom û ka-
lepîrên Îsraêlê re; min jî bi vî awayî
şîretê da. 16 Û niha zû bişînin û
bigihînin Dawid û bibêjin: Vê
şevê di buhurkên çolê de derbas
meke, lê belê muheqeq derbas
bibe; ya na dê qiral û netewa ku
pê re ne bêne daqurtandin. 17 Û
Yonatan û Ahîmaats li En-Rogelê
disekinîn û dê qîzikek xizmetkar
biça û agahiyê bida wan, ew ê jî
ji qiral re bibirana; ji ber ku ketina
wanî bajêr û xuyanîbûna wan ne-
dibû. 18 Lê belê ciwanekî wan dît
û gîhand Abşalom û ew her du bi
lez çûn û li Bahûrîmê ketin mala
zilamekî û di hewşa wî de bîrikek
wî hebû û daketin hûndirê wê.
19 Û pîrekek rûberekê rahişt û li
ser devê bîrê raxist û savar li ser
wê raxist û tu tiştek nehat zanîn.
20 Û qûlên Abşalom hatin malê,
cem pîrekê û gotin: Ahîmaats û
Yonatan li ku ne? Û pîrekê ji wan
re got: Cihoka avê derbas kirin û
çûn. Û wan lêkolînê kirin û gava
nedîtin, vegeriyan Orşelîmê.
21 Û paşî ku ew zilamana çûn wusa
bû ku, ev ji bîrikê derketin û çûn û
gîhandin qiral Dawid û ji Dawid
re gotin: Rabin û bi lezî avê der-
bas bikin; ji ber ku Ahîtofel li dijî
we şîretê da. 22 Û Dawid û hemû
netewa ku li cem in rabûn û Ur-
dunê derbas kirin; heta sibeh gewr
bû tenê zilamek nema ku Urdunê

derbas nekiribe. 23 Û Ahîtofel dît
ku li gor şîreta wî nekirine, kurtanê
li kerê xwe xist û rabû û çû bajarê
xwe, mala xwe û paşî ku karê mala
xwe rêz kir xwe xeniqand û mir û li
gora bavê xwe hate binax kirin.

*Dawid li Mahanaîmê*

24 Û Dawid hat Mahanaîmê. Û
Abşalom, ew bi xwe û hemû zi-
lamên Îsraêlê Urdun derbas ki-
rin. 25 Û Abşalom ji dêvla Yoab,
Amasa danî serê artêşê. Û Amasa
lawê zilamekî bi navê Îtrayê Îs-
raêlî bû û ketibû cem Abîgala qîza
Nahaş e û xwuşka Serûya ya diya
Yoab e. 26 Û Abşalom tevî Îsraêlê
li warê Gîleadê artêşgehê danîn.
27 Û wusa bû ku, dema Dawid
hate Mahanaîmê, ji bajarê Rabba-
ya lawên Ammon e, Şobiyê lawê
Nahaş û ji Lodebarê Makîrê lawê
Ammîêl û ji Rogelîmê Barzîllayê
Gîleadî 28 tevî doşek û legan û
kûzik û bona Dawid û netewa ku
li cem wî ne, bixwin genim û ceh
û arvan û genimê hatiye qelandin
û baqle û nîsk û nokê hatine qe-
landin 29 û hungiv û rûnê nivîşk
û mîhan û penêrê çêlekan anîn; ji
ber ku gotin: Netewe li çolê birçî
bûye, westiyaye û tî bûye.

*Mirina Abşalom*

18 Û Dawid netewa ku li cem
wî ne, jimartin û serdar û
sitvanan danîn ser wan. 2 Û Da-
wid netewê bi sê parîtî, ji sisê yek
di bin destê Yoab de û ji sisê yek
di bin destê Abîşayê birayê Yoab
de û lawê Serûya û ji sisê yek di
bin destê Îttayê Gatî de şand. Û
qiral ji netewê re got: Muheqeq ez
ê jî bi we re derkevim. 3 Lê belê
netewê gotin: Tuyê dernekeve; ji
ber ku ger em birevin, dê guh ne-
din me, ger nêviyê me bimirin dê
guh nedin me, lê belê tu mîna deh
hezarên me ne û niha ji bajêr ve,
ji bo alîkariya me amade bûna te
hîn jî qenctir e.
4 Û qiral ji wan re got: Ez ê yê ku
di çavê we de qenc e bikim! Û qi-
ral li ber derî sekinî û hemû nete-
we bi sedan û bi hezaran derketin.
5 Û qiral emir da Yoab û Abîşay
û Îtta û ji wan re got: Bona xatirê
min ji wî xortî re, ji Abşalom re
bi nermî bikin! Û dema qiral bona
Abşalom, emir dida hemûyên se-
rokan hemûya netewê bihîstin.
6 Û netewe derket beyarê, hem-
ber Îsraêlê û ceng di daristana
Efrayîm de bû. 7 Û netewa Îsraêlê
li wir, li ber qûlên Dawid xera bûn
û wê rojê li wir, şikestinek mezin
bû, bîst hezar kes (mir). 8 Û li wir,
ceng bi ser hemûya welêt ve be-
lav bû û wê rojê, ji xwarina ku şûr
xwar zêdetir daristanê xwar.
9 Û Abşalom rastî qûlên Dawid
hat. Û Abşalom li qantirê siwar
bûbû û qantir ket bin guliyên
himbiz yên darçiloyê û Abşalom

bi serê xwe bi darçiloyê ve hate
girtin û di navbera erd û ezman de
daliqandî ma û qantira di binî de
derbas bû û çû. 10 Zilamekî dît û
gîhand Yoab û got: A vay, Abşalom
di darçiloyekî de daliqandî dîtim.
11 Û Yoab ji zilamê ku jê re
gîhandiye re got: Û a vay; ma te
dît, çima te wî li wir li erdê nexist?
Û min ê niha deh parî zîv û şûtikek
bidana te! 12 Û zilam ji Yoab re
got: Ez hezar parî zîv bigrim nav
lepê xwe jî, dîsa ez destê xwe dirêjî
lawê qiral nakim; ji ber ku me bi
guhê xwe bihîstin ku qiral ji te re
û ji Abîşay û ji Îttay re bi gotina:
Qet mekin, bila tu kes destê xwe
li wî xortî, li Abşalom nexin! emir
da. 13 Ya na ger li dijî canê wî bi
fenekî bikirama û tu tiştek ji qiral
re veşartî namîne; tuyê bi xwe jî
li dijî min bisekiniya! 14 Û Yoab
got: Ez nikarim bi vî awayî bi te
re wext winda bikim. Û sê heb rim
girtin destê xwe û hîn Abşalom
di nava darçiloyê de sax bû wan
di dilê wî de çikandin. 15 Û deh
zilamên ciwan, ên ku çekên Yoab
dikişandin dora Abşalom girtin û
lê xistin û kuştin.
16 Û Yoab li boriyê xist û netewe
ji beradana pêy Îsraêlê ve vegeri-
ya; ji ber ku Yoab netewê parast.
17 Û Abşalom ragirtin û wî avêtin
kortala mezin ya di daristanê de
ye û komekî zehf mezin ji kevi-
ran li ser wî çêkirin û hemû Îsraêl,
hemû reviyan çadirên xwe. 18 Û
Abşalom gava hîn zindî bû, sitûna
di newala qiral de rahiştîbû û bona
xwe çikandibû; ji ber ku: Lawekî
minî navê min bijîne nîne got û
navê xwe li sitûnê kir û heta îroj jê
re bîrdariya Abşalom tête gotin.

*Dawid şînê digire*

19 Û Ahîmaatsê lawê Tsadok got:
Niha ez bazdim û ji qiral re miz-
gînê bidim ku niha XUDAN mafê
wî ji destên neyaran ve sitendiye.
20 Û Yoab jê re got: Tuyê îro nebe
mizgînvan, lê belê rojek din tuyê
mizgîniyê bidê; lê îroj tuyê miz-
gîniyê nedê, ji ber ku lawê qiral
miriye. 21 Û Yoab ji Kûşî re got:
Here, dîtina xwe bighîne qiral.
Û Kûşî ji Yoab re xwar bû û baz
da. 22 Û Ahîmaatsê lawê Tsadok
dîsa ji Yoab re got: Çi dibe bila
bibe, rica dikim ez jî ji pêy Kûşî
ve bazdim. Û Yoab got: Ma lawê
min, bona te mizgîniyek bi qencî
tuneye tuyê çima baz bidî? 23 Û
wî got: Çi bibe bila bibe, ez ê baz
bidim! Û jê re got: Bazde! Û Ahî-
maats ji rêya Havzayê ve baz da û
Kûşî derbas kir.
24 Û Dawid di navbera du deriyî
de rûniştîbû û nobedar derket xa-
niyê derî, ser dîwêr û çavên xwe
rakir û nihêrt û a vay, zilamek
tena xwe baz dida. 25 Û nobedar
bang kir û ji qiral re gîhand. Û qi-
ral got: Ger tena xwe be, di devê

wî de mizgînî heye! Û zilam her
ku diçû nêzîk dibû. 26 Û nobedar
zilamek dinî baz dide dît û no-
bedar bangî dergevan kir: A vay,
zilamekî dinî tena xwe baz dide!
got. Û qiral got: Ew jî mîzgînîvan
e. 27 Û nobedar got: Ez li bazda-
na yê pêşiyê dinêrim, mîna baz-
dana Ahîmaatsê lawê Tsadok e. Û
qiral got: Ew zilamekî qenc e û bi
mîzgînek qenc ve tê.
28 Û Ahîmaats bang kir û ji qiral
re got: Xweşî! Û ji qiral re xwar
bû û bi ser dev li erdê ve secde
kir û got: Xwedayê te XUDAN
bila pîroz be, zilamên ku li dijî
efendiyê min qiral re dest rakiri-
ne da dest! 29 Û qiral got: Gelo
ew xorta, Abşalom di xweşiyê de
ye? Û Ahîmaats got: Dema Yoab,
qûlê qiral û vî qûlê te şand tevli-
heviyek mezin dîtim, lê belê ka
çi bûye fêhm nekirim. 30 Û qiral
got: Vekişe aliyekî û li vir biseki-
ne! Û ew vekişî û sekinî.
31 Û a vay, Kûşî hat û Kûşî got:
Mizgînî ji efendiyê min qiral re; ji
ber ku XUDAN, ji destên hemû-
yên dijraberên te, îroj mafê te
sitend. 32 Û qiral ji Kûşî re
got: Gelo ew xorta, Abşalom
di xweşiyê de ye? Û Kûşî got:
Neyarên efendiyê min qiral
û hemûyên ku bona xerabi-
yê li dijî te rabûne bila mîna
wî xortî bibin! 33 Û qiral ji xiroşi-
yê bi lerizîn derket odeya ser
derî, giriya û dema diçû, wusa
digot: Lawê min Abşalom! Lawê
min, lawê min Abşalom! Xwezî-
ka ez li dêvla te bimirama! Ya
Abşalom, lawê min, lawê min!

*Yoab Dawid diazirîne*

19 Û ji Yoab re, bi gotina: A
vay, qiral bona Abşalom di-
girî û şînê dikişîne hate gîhandin.
2 Û xelasî, wê rojê bona hemûya
netewê bû şîn; ji ber ku netewe bi
gotina: Qiral bona lawê xwe bi êş
e, wê rojê bihîstin. 3 Netewa ku
dema ji cengê birevin dişermin
û mîna dizan diçin, wê rojê ne-
tewe jî mîna dizan ketin bajêr. 4
Û qiral wecê xwe nuxumand û
qiral bi dengekî bilind bang kir:
Lawê min Abşalom, ya Abşalom,
lawê min, lawê min! 5 Û Yoab
hate malê, cem qiral û got: Te bi
hezkirina yên ji te dikerihin û bi
kerihandina yên ji te hez dikin,
îro hemû qûlên xwe şermezar
kir, ew qûlên te, ku îro canê te û
canên lawên te û qîzên te û canên
jinên te û canên cariyên te xelas
kirin. 6 Ji ber, te îro gîhand ku se-
rokên te û qûlên te di çavê te de
ne tiştik in; ji ber, îro fêhm dikim
ku ger Abşalom zindî û em hemû
îro mirîbana dê di çavê te de ya
rast biba! 7 Û niha rabe û derke-
ve û dilên qûlên xwe xweş bike;
ji ber ku, ez bona mafê XUDAN
sondê didim ku, ger tu dernekeve

dê îşev tu kes li cem te nemîne, dê
ev jî bona te, ji hemû xerabiyên
ku ji zarokantiya te heta niha ha-
tine serê te hîn jî xerabtir bibe. 8
Û qiral rabû û di derî de rûnişt. Û
ji hemûya netewê re, bi gotina: A
vay, qiral di derî de rûdine! gîhan-
din û netewe hemû hatin ber qiral.

*Dawid vedigere Orşelîmê*

Lê Îsraêl jî, her kes reviyabûn ça-
dirên xwe. 9 Û di hemû ezbetên Îs-
raêlê de, hemûya netewê keftûleftê
dikirin û digotin: Qiral me ji destê
neyarên me xelas kir û ew me ji
destê Filistiyan ve xelas kir û niha
ji ber Abşalom ji welêt ve reviya.
10 Û Abşalomê ku me li ser xwe
bi qiraletî mesh kiribûn jî di cengê
de mir. Niha çima hûn di derheqê
anîna qiral de bêdeng dimînin?
11 Û qiral Dawid ji kahîn Tsadok
û ji kahîn Abîatar re şand û got:
Ma çima di qiral anîna mala xwe
de hûn dibin yên dawîn? Bi go-
tina: Gotina hemûya Îsraêlê ya
ku bona anîna wî yî mala xwe
gehîştiye guhên qiral ji kalepîrên
Cihûda re bibêjin. 12 Hûn birayên
min in, hestiyê min û goştê min
in û di anîna qiral de hûn çima
dibin yên dawîn? 13 Û ji Amasa
re bibêjin: Ma tu ne hestî û goştê
min î? Ger her tim tu li ber min,
li dêvla Yoab nebe serokê artêşê,
bila Xwedê ya ûsa û zêdetirê wê li
min bike. 14 Û mîna tenê zilamek
bin dilên hemû zilamên Cihûda
pê de meyl kirin û şandin û ji qi-
ral re gotin: Tu tevî hemû qûlên
xwe vegere. 15 Û qiral vegeriya
û gîhaşt Urdunê. Û Cihûda, bona
ku pêşwaziyê li qiral bike û bona
ku qiral ji Urdunê ve derbas bike
hate Gîlgalê.
16 Û Şîmeiyê lawê Gerayê Ben-
yamînî yê ku ji Bahûrîmê yî, tevî
zilamên Cihûda, bona ku pêrgîni-
yê ji qiral re bike, bi lezî kir û da-
ket. 17 Û li cem wî, ji Benyamînê
hezar kes û Sîbayê xizmetkarê
mala Saûl û tevî wî panzdeh
lawên wî û bîst qûlên wî hebûn
û di pêşiya qiral de ji Urdunê ve
derbas bûn. 18 Û bona derbas ki-
rina maliyên qiral û bona kirina
yê ku di çavê wî de qenc e, lotke
derbas bû. Û Şîmeiyê lawê Gera,
paşî ku ji Urdunê ve derbas bû li
ber qiral ket. 19 Û ji qiral re got:
Bila efendiyê min ji min re guneh
nehesibîne û bila di roja ku efen-
diyê min qiral ji Orşelîmê derket
de, rêşaşiya ku ev qûlê wî kiriye
bila qiral, bona ku bixe dilê xwe,
di bîra xwe de neyne! 20 Ji ber,
ev qûlê te dizane ku sûc kiriye û a
vay, bona ku pêrgîniyê ji efendiyê
xwe qiral re bikim di daketinê de,
di hemûya mala Ûsiv de pêşiyê
îroj ez hatim.
21 Lê belê Abîşayê lawê Serûya
bersivê da û got: Ma Şîmeiyê ji
Mesîhê XUDAN re naletê kiri-

ye, dê bona vêya neyê kuştin?
22 Û Dawid got: Ya lawên Serûya,
bona ku îro hûn ji min re bibin
neyar, di navbera min û we de çi
heye? Ma îro li Îsraêlê tu kes tête
kuştin? Ji ber, ma qey ez nizanim
ku îro ez li ser Îsraêlê bûme qiral?
23 Û qiral ji Şîmeî re got: Tuyê
nemire! Û qiral jê re sondê da.
24 Û Mefîboşetê lawê Saûl, bona
ku pêrgîniyê ji qiral re bike daket;
ji roja ku qiral çûbû, heta roja ku
vegeriya ne li lingên xwe û ne jî li
rîha xwe nenihêrtibû û kincê xwe
neşuştibû. 25 Û wusa bû ku, dema
bona pêrgîniya qiral ji Orşelîmê
ve hat qiral jê re got: Mefîboşet,
ma çima tu bi min re derneket?
26 Û ew bersivê da: Ya efendiyê
min qiral, xizmetkarê min, min
xapand, ji ber ku ev qûlê te: Ez
bona xwe kurtanê li kerê bixim û
lê siwar bibim û tevî qiral herim
gotibûm; ji ber ku qûlê te kûd e!
27 Û qûlê te ji efendiyê min qiral
re xerab xuya daye û efendiyê min
qiral, mîna milyaketê Xwedê ye û
yê ku di çavê te de qenc e bike.
28 Ji ber, çawa ku hemûya mala
bavê min li ber efendiyê min qiral,
xeynî lawên mirinê ne tiştek bûn,
te ev qûlê xwe xist nava yên ku
di sifra te de xwarinê dixwin û êdî
ne mafê min heye û êdî bona ku
ji qiral re biqêrim çiyî min heye?
29 Û qiral jê re got: Ma çima tu
di derheqê karên xwe de gotinê
dûdirêj dikî? Ez dibêjim ku, tu û
Sîba erdê li hev par bikin. 30 Û
Mefîboşet ji qiral re got: Madem
ku efendiyê min qiral bi xweşiyê
hat, bila hemûyê jî ew rahêle.
31 Û Barzîllayê Gîleadî ji Ro-
gelîmê ve daket û bona ku qiral ji
Urdunê ye derbas bike, bi wî re ji
Urdunê derbas bû. 32 Û Barzîllay
zehf kalepîr, heyştê salî bû û dema
qiral li Mahanaîmê dima, wî bi
xwe xwedî kiribû; ji ber ku ew zi-
lamekî zehf mezin bû. 33 Û qiral ji
Barzîllay re got: Bi min re derbas
bibe û ez li Orşelîmê, li cem xwe
te xwedî bikim. 34 Û Barzîllay ji
qiral re got: Ma rojên salên temena
min çiqas in ku ez bi qiral re der-
kevim Orşelîmê? 35 Ez îro heyştê
salî me; ma ez dikarim yê qenc
û xerab ji hev re cuda bikim? Ev
qûlê te, ma ez dikarim tahma xwa-
rin û vexwarina xwe bigirim? Ma
ez dikarim dengê stranbêjên jin û
mêr guhdarî bikim? Û êdî çima ev
qûlê te, ez ji efendiyê xwe qiral
re bibim bargiranî? 36 Ev qûlê te
tenê dixwaze ku bi qiral re Urdunê
derbas bike û ma çima dê qiral vê
xelatê bide min? 37 Niha ez rica
dikim, bila qûlê te vegere û di ba-
jarê min de, li cem gorên dayik û
bavê xwe bimirim. Lê belê, a vay,
qûlê te Kîmham; bila ew bi efendi-
yê min qiral re derbas bibe û yê ku
di çavê te de qenc e ji wî re bike.
38 Û qiral got: Dê Kîmham bi min

re derbas bibe û ez ê yê ku di çavê
te de qenc e ji wî re bikim û her
tiştê ku tuyê ji min re bixwazî, ez
ê bona te bikim. 39 Û hemûya ne-
tewê ji Urdunê derbas bûn, qiral jî
derbas bû û qiral Barzîllay ramû-
sand û wî pîroz kir û ew vegeriya
cîhê xwe.
40 Û qiral derbasî Gîlgalê bû û
Kîmham bi wî re derbas bû û
hemûya netewa Cihûda û nêviyê
netewa Îsraêl qiral derbas kirin.
41 Û a vay, hemû zilamên Îsraêlê
hatin cem qiral û ji qiral re gotin:
Ma çima birayên me, zilamên
Cihûda te diziyan û qiral û ma-
liyên wî û tevî wî hemû zilamên
Dawid ji Urdunê derbas kirin?
42 Û hemûya zilamên Cihûda ber-
sivê dan zilamên Îsraêl: Ji ber ku qi-
ral ji merivên me ye û ma çima hûn
bi vî karî re ewqasî hêrs bûn? Ma
me tu tiştekî ji kîsê qiral ve xwarin?
An jî xelatekî da me? 43 Û zilamên
Îsraêl bersivê dan zilamên Cihûda
û gotin: Di qiral de deh parên me
hene û him jî di Dawid de ji we zê-
detir heqê me heye û ma çima we
me biçûk dîtin û di anîna qiral de,
pêşiyê reyê me nehatin sitendin? Û
gotinên zilamên Cihûda, ji gotinên
zilamên Îsraêl ve tundtir bûn.

*Şeba serîhildide*

20 Û Şebayê lawê Bîkriyê
Benyamînî, zilamekî bêrêz
li wir bû û li boriyê xist û got: Di
Dawid de para me nîne û di lawê
Îşay de mêrasa me nîne; ya Îs-
raêl, her kes herin çadirên xwe!
2 Û hemû zilamên Îsraêlê ji paşî
Dawid vekişiyan û li pêy Şebayê
lawê Bîkrî ketin; lê belê zilamên
Cihûda ji Urdunê heta Orşelîmê,
bi qiralên xwe ve zeliqîn.
3 Û Dawid hate mala xwe ya ku
li Orşelîmê yî û qiral, deh pîrekên
ku cariyên wî yên ku bona li ben-
da malê bin hiştibûn rahişt û danî
malekî di bin çavan de ye û wan
xwedî kir, lê belê neket cem wan.
Û heta roja mirina xwe bi jinebîti-
yê jiyan û girtî man.
4 Û qiral ji Amasa re got: Heta sê
rojî, ji min re bangî zilamên Cihû-
da bike û tu li vir amade be. 5 Û
Amasa, bona ku zilamên Cihûda
bîne cem hev çû; lê belê ji dema
ku jê re gotibû dereng ma. 6 Û Da-
wid ji Abîşay re got: Niha Şebayê
lawê Bîkrî, dê ji Abşalom hê jî
zêdetir xerabiyê bi me re bike; tu
qûlên efendiyê xwe rahêle û bera
pêy wî bide, ya na dê bona xwe
bajarên bi dîwar bibîne û ji ber ça-
vên me bireve! 7 Û zilamên Yoab
û Keretî û Peletiyan û hemûyên
mêrxasan ji pêy wî derketin û
bona ku bera pêy Şebayê lawê Bî-
krî bidin, ji Orşelîmê ve derketin.
8 Hîn ew li Gîbeonê li cem kevirê
mezin bûn, Amasa bona pêrgîni-
ya wan hat. Û Yoab qeftanê xwe
li xwe kiribû û li ser qeftanê wî

kemberek hebû û di qewda wî
de şûrek li pişta wî bû û gava ew
derdiket şûr ket erdê. 9 Û Yoab ji
Amasa re got: Birayê min tu baş
î? Û Yoab, bona ku wî ramûsî-
ne, bi destê xwe yî rastê bi rîha
Amasa ve girt. 10 Û Amasa şûrê
ku di destê Yoab de ye, xwe neda
alî û bi wê, li zikê Amasa xist û
rêviyên wî bi erdê ve rijand û cara
duwemîn lê nexist û ew mir.
Û Yoab û birayê xwe Abîşay,
bera pêy Şebayê lawê Bîkrî dan.
11 Û yekî ji ciwanên Yoab li
ber wî sekinî û got: Her kî ku ji
Yoab ve razî be û her kî ku alî-
kirê Dawid be, bila li pêy Yoab
ve werin. 12 Û Amasa di nava
rêya mezin de di nav xwînê de
digemirî. Û gava ew zilam dît ku
hemûya netewê sekinîne, Amasa
ji rêya mezin ve rakir û bir beyarê
û kincekî avêt ser wî, ji ber, dît
her zilamê ku tête cem disekine.
13 Û gava Amasa ji ser rêya me-
zin ve hate rakirin, her kes, bona
bera pêy Şebayê lawê Bîkrî bidin,
li pêy Yoab çûn.
14 Û Yoab heta Abelê û Beyt-
Maakayê û heta hemû Beriyan
ji nav hemûya eşîrên Îsraêlê ve
derbas bû û civiyan û ew jî li pêy
çûn. 15 Û di bajarê Abelê yê Beyt-
Maakayê de dor li Şeba girtin û
meterîsê li hember bajêr danîn û
xwe sipart dîwêr û hemû netewa
ku li cem Yoab bûn, bona ku dîwêr
xera bikin, teşimê vedikirin. 16 Û
ji bajêr ve pîrekek baqil bang kir:
Guhdarî bikin, guhdarî bikin! Ez
rica dikim, ji Yoab re bibêjin, bila
nêzîkî vir were, ez ê pê re hevpey-
vînê bikim! 17 Û ew nêzîkî wê bû
û pîrekê got: Ma tu Yoab î? Û wî
got: Ez im. Û pîrekê jê re got: Go-
tinên vê cariya xwe guhdarî bike!
Û wî got: Ez guhdarî dikim. 18 Û
pîrek axifî û got: Ji berê ve bi go-
tina: Muheqeq dê li Abelê şîretê
bipirsin dihat gotin û bi vî awayî
karî diqedandin. 19 Ez li Îsraêlê
ji yên ku ji aştiyê hez dikin û ji
yên dilsozin im; tu bona kuştina
bajarekî, bona li Îsraêlê kuştina
dayikekê dixebitî; ma çima tu di-
xwazî mêrasa XUDAN daqurtînî?
20 Û Yoab bersivê da û got: Bila
Xwedê nîşan mede, nîşan mede
ku ez daqurtînim an jî xera bikim!
21 Ev kar ne wusa ye; lê belê zi-
lamekî bi navê Şebayê lawê Bîkrî,
ji çiyayên Efrayîmê, li dijî qiral, li
dijî Dawid destê xwe rakir; tenê
wî bidin ku ez ji bajêr ve herim.
Û pîrek ji Yoab re got: A vay, dê ji
ser dîwêr ve seriyê wî ji te re bête
avêtin. 22 Û pîrek bi zaniyariya
xwe çû cem hemûya netewê. Û
serê Şebayê lawê Bîkrî jê kirin û
wê ji Yoab re avêtin. Û borî hate
lêxistin û ji bajêr ve belav bûn, her
kes çûn çadirên xwe. Û Yoab ve-
geriya Orşelîmê, cem qiral.

*Wezîfedarên Dawid*

23 Û Yoab li ser hemûya artêşa
Îsraêlê û Benayayê lawê Yehoya-
da li ser Keretî û Peletiyan bû
24 û Adoram li ser suxrekaran bû
û Yehoşafatê lawê Ahîlûd, bûyerni-
vîs bû 25 û Şeva katip bû û Tsadok
û Abîatar kahîn bûn 26 û Îrayê Yaîrî
jî wezîrê Dawid bû.

*Gîbeoniyan tolê hiltînin*

21 Û di rojên Dawid de li pêy
hev, sê sal xela bû û Dawid
ji XUDAN re pirsiya. Û XUDAN
got: Ji ber Saûl û ji ber mala wî
yî bi xwîn e, ji ber ku Gîbeoniyan
kuştin. 2 Û qiral bangî Gîbeoni-
yan kir û ji wan re got û Gîbeonî
ne ji lawên Îsraêl bûn, lê belê yên
ku ji ber Amoriyan mayîne bûn
û lawên Îsraêl sondê ji wan re
dayîbûn û Saûl ji ber xîreta wan
yan ku di oxra lawên Îsraêl û
Cihûda de kiribûn, bona ku li wan
bixe şuxulî bû 3 û Dawid ji Gîbe-
oniyan re got: Ma ez bona we çi
bikim? Û bi çi kefaretê bikim ku
hûn mêrasa XUDAN pîroz bikin?
4 Û yên Gîbeonî jê re gotin: Bi
Saûl re û bi mala wî re karê me
ne zêr û zîv in û li Îsraêlê zilam
kuştin jî bi me nakeve. Û wî got:
Hûn çi bibêjin, ez ê wê bi we
bikim. 5 Û ji qiral re gotin: Bila
ji lawên zilamê ku dixwest me bi-
qedîne û bona ku em helaq bibin
û di hemûya sînorên Îsraêlê de
nemînin, dek û dolaban li dijî me
datanî, heft kes ji me re bête dayîn
6 û em wan li Gîbeaya Saûl, ya
ku XUDAN bijartibû, bona XU-
DAN wan daliqînin. Û qiral got:
Ez ê wan bidim.
7 Û di navbera Dawid û Yonatanê
lawê Saûl de, ji ber ku di navbera
wan de peymana XUDAN hebû,
qiral Mefîboşetê lawê Yonatanê
lawê Saûl parast. 8 Û her du lawên
ku Rîtspaya qîza Ayya ji Saûl re
anîne dinê, Armonî û Mefîboşet û
pênc lawikên ku (xwuşka) Mîkala
qîza Saûl, ji Adrîêlê, lawê Barzîl-
layê Mîhlayî re anîne dinê qiral
girtin 9 û wan dan destên Gîbeo-
niyan û wan di çiyê de, li ber XU-
DAN daliqandin û her heft pev re
ketin. Û ew di rojên çinandinê de,
di rojên pêşîn de, di destpêka çin-
andina ceh de hatin kuştin.
10 Û Rîtspaya qîza Ayya pertalê
rahişt û wê bona xwe li ser zinarê
ve raxist; ji destpêka çinandinê,
heta ku ji ezman av bi ser ve riji-
yan, di rojan de civîkên ezman û bi
şevan jî heywanên beyar nehiştin
ku herin ser wan. 11 Û kirina
Rîtspaya qîza Ayyaya cariya Saûl
e ji Dawid re hate gîhandin.
12 Û Dawid çû û hestiyên Saûl û
hestiyên lawê wî Yonatan ji mêr-
xasên Yabeş-Gîleadê sitend; di roja
ku Filistî li Gîlboayê li Saûl xisti-
ne, van egîdan wan ji qada Beyt-
Şanê ya ku Filistiyan wan daliqan-

dibûn dizîbûn 13 û hestiyên Saûl
û hestiyên lawê wî Yonatan ji wir
derxistin û hestiyên yên ku hatine
daliqandin dan hev. 14 Û hestiyên
Saûl û hestiyên lawê wî Yonatan li
warê Benyamîn, li Tselayê, di gora
bavê wî Kîş de binax kirin û her
tiştên ku qiral emir dabû, kirin. Û
paşî vêya, Xwedê bona welêt dua-
yan qebûl kir.

*Şerê li dijî Filistiyan*

1.Dîr 20,4-8

15 Û dîsa cenga yên Filistî, bi Îs-
raêlê ve bû û Dawid û tevî wî qûlên
wî daketin û li hember Filistiyan
cengê kirin. Û Dawid westayî ket;
16 Îşbî-Benobê ji lawên Rafa[1],
got: Ez li Dawid bixim û girani-
ya rima wî sê sed şekel tûnc bû
û şûrekî nû girtibû ser xwe. 17 Û
Abîşayê lawê Serûya alîkariyê bi
Dawid re kir û li yê Filistî xist û
wî kuşt, wê gavê zilamê Dawid jê
re sondê dan û gotin: Tuyê êdî bi
me re dernekeve cengê ku, tu qen-
dîla Îsraêlê netefînî.
18 Û li pêy vê yekê wusa bû ku,
dîsa bi Filistiyan re, li Gobê ceng
çêbû; wê gavê Sîbbekayê Hûşayî,
li Safê ku ji lawên Rafa ye xist.
19 Û dîsa bi Filistiyan re, li Gobê
ceng çêbû Elhananê lawê Yaare-
Oregîmê Beytlehemî, li birayê
Golyatê Gatî xist, destê rima wî,
mîna mirdiyaqa çuxê bû. 20 Û
dîsa li Gatê ceng çêbû û li wir zi-
lamekî qam dirêj hebû û tilîkên
lingên wî û tilîkên destên wî şeş
û şeş, bitûmî bîst û çar bûn; ew jî
ji Rafayê re welidîbû. 21 Û qadê
ji Îsraêlê xwest û Yonatanê lawê
Şîmeiyê birayê Dawid li wî xist.
22 Ev her çar kes li Gatê, ji Rafa
re hatibûn dinê û bi destê Dawid û
bi destê qûlên wî ve ketin.

*Murxa Serfiraziyê ya Dawid*

Zeb 18

22 Û roja ku XUDAN Dawid
ji destên hemû neyarên wî
û ji destê Saûl ve xelas kir, Dawid
gotinên vê qesîdeyê ji XUDAN re
xwend 2 û got:
XUDAN, zinarê min û birca min,
belê, xelaskirê min e!
3 Xwedê zinarê min e, ez ê xwe
pê bisitirînim; mertalê min, hêza
xelasiya min, qûleya minî bilind
û cîhê minî sitargehê ye.
Ya xelaskirê min, tu min ji tenga-
siyan ve xelas dikî!
4 Ez ê bangî XUDANê ku liyaqî
hemdê ye bikim.
Û ez ê ji neyarên xwe ve xelas
bibim.
5 Ji ber ku şepêlên mirinê dora
min girtine; şêlavên bêkêriyê min
bizdandin.
6 Tayên warê miriyan dor li min
girtin; fitrakên mirinê bi ser min
ve hatin.

---

[1] An jî: Dêw.

7 Di nava tengasiya xwe de ji
XUDAN re dua kirim û Xwedayê
xwe bangî hawarê kirim
û ji perestgeha xwe dengê min bihîst
û feryada min gîhaşt guhên wî.
8 Wê gavê dinya hol bû û lerizî;
bingehên ezmanan leyîstin û leri-
zîn, ji ber ku ew hêrs bû.
9 Ji pozê wî ve duh bilind bû; ji
devê xwe ve agir xwar û qedand,
di wî de pêt bi hev ketin.
10 Û wî ezmanan jî xwar kir û
daket û tariya reş di bin lingên
wî de bû.
11 Û li kerûbiyek siwar bû û çû, li
ser baskên ba de hate xuyanî kirin.
12 Û tariyê, civakên avê, ewrên
reş ên asîmanê li dora xwe kirin
çardaxan.
13 Ji biriqandina ber wî; pêtên
agirê pêketin.
14 XUDAN ji ezmanan ve gurmi-
ya û yê Bilind e deng da.
15 Û wî tîran reşand û wan belav
kir; brûskan berda û wan xera kir.
16 Ji pekandina XUDAN, ji lêxisti-
na hilma pozê wî, kûraniyên behran
hatin dîtin û bingehên dinê vebûn.
17 Wî ji jor ve destê xwe dirêj
kir, bi min girt û min ji gellek
avan derxist.
18 Ew min ji neyarê minî xwurt, ji
yên ku ji min dikerihin ve azad kir;
ji ber ku ew ji min dijwartir bûn.
19 Di roja minî bêtarê de derketin
pêşiya min; lê belê XUDAN bû
piştgirê min.
20 Û wî min derxist cîhekî fireh;
wî min xelas kir, ji ber ku ji min
hez kir.
21 XUDAN li gor baweriya min
da min; li gor paqijiya destê min,
berdêla min da.
22 Ji ber ku bi rêyên XUDAN ve
girtim û bi xerabiyê ji Xwedayê
xwe ve neqetiyam.
23 Ji ber ku hemû daraziyên wî li
ber min in û zagonên wî jî, ez ji
wan neqetiyam.
24 Û ez bi wî re bêqisûr bûm û ji
gunehê xwe ve bi xwe girtim.
25 Û bo vê yekê, XUDAN li gor
rastiya min, li ber çavê xwe, li gor
paqijiya min berdêla min da.
26 Tuyê bi yê xêrkir re bibî xêrkir
û bi zilamê kamil re bibî kamil.
27 Tuyê bi yê pak re bibî pak û bi
zilamê xwar re tuyê çewt bibî.
28 Û tuyê netewa belengaz xelas
bike, lê belê çavên te li dijî qur-
reyan e, tuyê wan nizm bike!
29 Ji ber ku çiraya min tu yî, ya
XUDAN û dê XUDAN tariya
min ronî bike.
30 Ji ber ku ez bi te re êrîşî ser
leşkeran dikim û bi Xwedayê xwe
re dîwar derbas dikim.
31 Xwedê, rêya wî kamil e;
gotina XUDAN pak e û bona
hemûyên ku xwe pê sitirandine
mertal e.
32 Ji ber ku, ma xeynî XUDAN
Xwedê kî ye? Û xeynî Xwedayê
me zinar kî ye?

33 Xwedê qûleya min ya xwurt e
û kamilan di rêya xwe de dajo.
34 Ew lingên min dike mîna
lingên askan û min li ser cîhên bi-
lind ve disekinîne.
35 Destên min bona cengê fêr
dike ku, bazûyên min kevana tûn-
cî divenîn in.
36 Û te mertala xelasiya xwe da
min û xêra te min mezin kir.
37 Te cîhê şopên min fireh kir û
lingên min neşemitîn.
38 Bera pêy neyarên xwe damr û
wan helaq kirim û heta ku ew ne-
qediyan ez venegeriyam.
39 Û wan qelihandim û wan eci-
qandim û êdî hêz neanîn ku rabin
û ketin bin lingên min.
40 Û ji ber ku te bona cengê min bi
hêzê ve xemiland; yên li dijî min
radibin, di bin min de rûxandin.
41 Û te piştên neyarên min jî ji
min re da zivirandin û yên ku ji
min dikerihin jî tune kirim.
42 Ew nihêrtin, lê belê xelasker
tunebû; li XUDAN nihêrtin, lê
belê bersivê neda wan.
43 Û wê gavê mîna toza erdê wan
eciqandim; wan mîna heriya kuçê
girtim bin lingan û cûtim[1].
44 Û te ji keftûleftên netewa min,
min azad kir; bona ku ji netewan
re bibim serî, te min parast;
dê neteweyek ku pê nizanim,
qûlitiyê ji min re bike.

[1] Eciqand, perçiqand.

45 Dê lawên biyanan ji min re hustî
xwar bikin; dema guhên wan bi-
bihîzin dê îtaetê ji min re bikin.
46 Dê lawên biyanan bêhîlet
bimînin û bi lerizînê dê ji bircên
xwe ve derkevin.
47 XUDAN zindi ye û bila Zinarê
min pîroz be! Û bila Zinarê xela-
siya min Xwedê bilind bibe!
48 Ew Xwedayê ku, tolan dide
min, neteweyan tabihî min dike.
49 Û ji nava neyarên min, min der-
dixîne; belê, tu li hember yên ku li
dijî min radibin min bilind dikî; ji
zilamê zordest min azad dikî.
50 Bo vê yekê, ya XUDAN, ez
di nava neteweyan de şikiryê ji te
re dikim û sitranan ji navê te re
dibêjim.
51 XUDAN xelasiyên mezin dide
qiralê xwe û ji Mesîhê xwe re, ji
Dawid re û ji nîjada wî re,
abadîn xêrê dike.

*Gotinên Dawid yên dawîn*

23 Û gotinên Dawid yên
dawîn ev in:
Dawidê lawê Îşay dibêje û zi-
lamê ku bi bilindahiyan ve hati-
ye hilkişandin, Mesîhê Xwedayê
Aqûp û helbestvanê Mezmûra
şêrîn ya Îsraêlê dibêje:
2 Ruhê XUDAN, bi navdîtiya
min ve got û gotina wî, li ser zi-
manê min bû.
3 Xwedayê Îsraêlê got, Zinarê Îs-
raêlê ji min re got:

Yê ku li ser mirovan bi serrastî
serweriyê dajo, yê ku bi tirsa
Xwedê serweriyê dajo.
4 Dê bibe mîna sibehek bê ewr,
dema roj hilê, dê bibe mîna nûra
sibehê; biriqandina wî, paşî baranê
ji erdê ve gîhayê teze bilind dike.
5 Bi rastî, mala min bi Xwedê
re ne wusa ye; lê belê bi min re
peymana abadîn danî; her tiştê wî
serrast û ewle ne; ji ber çawa ku
hîn wî bi şuv nekiriye jî ew xelasî
û xwesteka min e!
6 Lê belê yên bêkêr, hemûyên wan
dê bibin mîna kelema ku bête avêtin.
Ji ber ku bi dest ve nayên girtin.
7 Lê belê zilamê ku destî wan
bide, divê bi hesin û destikê rimê
ve xwe bi çek bike. Û dê di cîhên
xwe de, bi agir ve bi tûmî bên
şewitandin.

*Leşkerên Dawid yên Mêrxas*

1.Dîr 11,10-47; 27,1-15

8 Navê mêrxasên Dawid ev in:
Serê sisiyan Yoşeb-Başşebetê Tah-
kemonî, Adînoyê Etsnî yê ku li
hemberê heyşt sed kesê ku di der-
bekê de hatine lêxistin ew bû.
9 Û li pêy wî, yê ku lawê zilamekî
Ahohî, lawê Doday Eleazar bû,
yê ku bona cengê ji Filistiyan ve
qadê xwestiye û dema zilamên Îs-
raêlê çûn, yek ji sê egîdên ku tevî
Dawid mane bû. 10 Ew rabû û
heta ku destê wî westiya, bi şûr ve
zeliqî li Filistiyan xist û XUDAN
wê rojê xelasiyek mezin çêkir û
netewe, tenê bona talanê rahêle, li
pêy wî vegeriyan.
11 Û li pêy wî, Şammayê lawê
Agenê Hararî bû. Û Filistiyan mîna
liqekê civiyan û li wir pariyek zevi-
yê, ya bi nîsk ve tijî hebû û netewe
ji ber Filistiyan ve reviyan. 12 Lê
belê, ew di nava zeviyê de sekinî û
wê parast û li Filistiyan xist û XU-
DAN xelasiyekî mezin kir.
13 Û ji Sîhên serî ve sisê daketin
û di dema çinandinê de hatin cem
Dawid, şikefta Adûllamê û liqa
Filistiyan di çemê Refayîmê de
artêşgehê danîn. 14 Û Dawid wê
gavê li bircê bû û leşkerên Filisti-
yan wê gavê li Beytlehemê bûn.
15 Û Dawid bêrî kir û got: Xwe-
zîka yek, ji ava bîrika ku li ber de-
riyê Beytlehemê ye avê bide min!
16 Û ev her sê mêrxas, artêşa Filis-
tiyan qelişandin û ji bîrika Beyt-
lehemê ya ku li ber deriye avê
kişandin û wê girtin û ji Dawid re
anîn; lê belê nexwest ku jê vexwe
û wê ji XUDAN re bi pêşkêşîbûnê
rijand. 17 Û wî got: Ya XUDAN,
bila kirina vêya ji min dûr be, ma
qey ez xwîna zilamên ku canên
xwe xistin talûkê û çûn vexwim?
Ji ber vê yekê, nexwest ku vexwe.
Ev tiştana her sê egîdan kirin.
18 Û Abîşayê birayê Yoab û lawê
Serûya, serokê Sisiyan bû. Û li
hember sê sed kesî rima xwe rakir
û wan kuştin û di nav her sê mêrxa-

san de navê wî hebû. 19 Ma ji her
sê mêrxasî, ne yê herî bi şeref bû?
Û bû serokê wan; lê belê negihîşt
Sisiyên yekem.
20 Lawê zilamekî mêrxas yê
ji Kabtseelê, Benayayê lawê
Yehoyadayî û karên xwurt kiri-
ne li du lawên Arîêlê Moabî xis-
tin û ya din, rojekî bi berf daket
û di nava kortalê de li şêrekî xist.
21 Û li Misiriyekî laşgir xist û
di destê yê Misirî de rim hebû û
bi ço ve daket cem wî û rimê ji
destê Misirî kişand û sitend û wî
bi rima wî ve kuşt. 22 Benayayê
lawê Yehoyada van tiştana kirin û
di nav her sê mêrxasî de navê wî
hebû. 23 Ji Sîhan bişereftir bû, lê
belê negihîşt Sisiyên yekem û Da-
wid wî danî ser parêzgeran.
24 Asahelê birayê Yoab yek ji
Sîhan bû; Elhananê lawê Dodoyê
Beytlehemî, 25 Şammayê Harodî,
Erîkayê Harodî, 26 Heletsê Pal-
tî, Îrayê lawê Îkkeşê Tekoayî,
27 Abîezerê Anatotî, Mebbûnayê
Hûşayî, 28 Tsalmonê Ahohî,
Maharayê Netofayî, 29 Helebê
lawê Baananê Netofayî, Îttayê
lawê Rîbayinê ji Gîbeaya lawên
Benyamîn e, 30 Benayayê Pîra-
tonî, Hîdayê ji newalên Gaaşêyî,
31 Abî-Albonê Arbayî, azma-
vetê Barhûmî, 32 Elyahbayê
Şaalbonî, lawên Yasen, Yonatan,
33 Şammayê Hararî, Ahîamê lawê
Şararê Ararî, 34 Elîfeletê lawê
Ahasbay, lawê Maakal, Elîamê
lawê Ahîtofelê Gîloyî, 35 Hets-
royê Karmelî, Paarayê Arbayî,
36 Îgalê lawê Natanê Tsobayî, Ba-
niyê Gadî, 37 Tselekê Ammonî,
Naharayê Beerotî, çekdarên Yo-
abê lawê Serûya, 38 Îrayê Yîtrî,
Garebê Yîtrî, 39 Ûriyayê Hîttî;
hemû sîh û heft bûn.

*Dawid jimartinê dike û Daraziya Xwedê tê*

1.Dîr 21,1-17; 27,23-4

24 Û li dijî Îsraêlê hêrsa XU-
DAN dîsa sor bû û bi go-
tina: Here Îsraêl û Cihûda bijmê-
re! Dawid li dijî wan kişkişand.
2 Û qiral ji serokê artêşê Yoabê li
cem bû re got: Niha ji Danê heta
Beer-Şebayê di nava hemûyê
eşîrên Îsraêlê de bigere û netewê
bijmêre û ez bi hejmara netewê
ve bizanibim. 3 Û Yoab ji qiral
re got: Bila Xwedayê te XUDAN
netewê, her çiqas be, sed qat hîn jî
zêdetir bike û bila çavên efendiyê
min qiral bibînin; lê belê ma çima
ev tişt bi pêxweşiya efendiyê min
qiral ve tê[1]? 4 Lê belê gotina qiral,
li hember Yoab û li hemberî se-
rokên artêşê bi ser ve ket. Û Yoab
û serokên artêşê, bona ku netewa
Îsraêlê bijmêrin, ji ber qiral ve
derketin. 5 Û ji Urdunê ve derbas
bûn û li aliyê rastê bajarê ku di

[1] An jî: ...çima efendiyê min qiral vî tiştî dixwazî?

nava newala Gadê de yî, li Areorê
de konê danîn 6 û hatin Yazerê û
Gîleadê û warê Tahtîm-Hodşiyê
û Dan-Yanê û dor bi dor hatin
Saydayê 7 û hatin birca Sûrê,
hemû bajarên Hîvî û Kenaniyan
û li Beer-Şebayê, derketin başûrê
Cihûdayê. 8 Û li hemûya welêt
ve geriyan û paşî neh meh û bîst
rojî hatin Orşelîmê. 9 Û Yoab hej-
mara yên ku hatine nivîsandin da
qiral û li Îsraêlê, heyşt sed hezar
mêrxasên ku şûr dikişînin hebûn
û zilamên Cihûda pênc sed hezar
kes bûn.
10 Û paşî ku netewê jimartin, dilê
Dawid wî bêaram kir. Û Dawid ji
XUDAN re got: Di karê ku kirim
de, sûcekî mezin kirim û niha ya
XUDAN, ez hewînê dikim, gu-
nehê vî qûlê xwe paqij bike; ji ber
ku zehf bêaqilî kirim! 11 Û Da-
wid sibehê rabû û ji yê ku Dibîne
yê Dawid re, ji Gad peyxamber re
ev gotina XUDAN hat: 12 Here û
ji Dawid re bibêje: XUDAN wusa
dibêje: Ez sê tiştî datînim ber te;
bo xwe ji wan yekî hilbijêre ku ez
ji te re wê bikim. 13 Û Gad hat
cem Dawid û jê re gîhand û jê re
got: Ma bila ji te re, heft sal xela
di welatê te de hebe? Ya na dema
neyarên te bera pêy te bidin tuyê
sê mehî ji ber wan birevî? Ya na
li welatê te sê roj weba çêbibe?
Niha bifikire û binêre, ez çi bersi-
vî ji yê ku min şandiye re bibim?
14 Û Dawid ji Gad re got: Ez pirr
aciz dibim; niha em bikevin destê
XUDAN; rehmetên wî pirr in û ez
nekevim destê mirov!
15 Û XUDAN ji sibehê heta wexta
ku hatiye bijartin webayê şand
ser Îsraêlê û ji Danê heta Beer-
Şebayê heftê hezar kes ji netewê
mirin. 16 Û dema milyaket, bona
ku Orşelîmê helaq bike, destê
xwe berbi wê dirêj kir, XUDAN ji
ceza kişandinê ve poşman bû û ji
milyaketê ku dê netewê helaq bike
re: Bes e! Niha destê xwe bikişîne,
got. Û milyaketê XUDAN li cem
cîhê bêndera Aravnayê Yebûsî bû.
17 Û dema milyaketê ku li netewê
xistiye dît, Dawid bi XUDAN re
axifî û got: A vay, ez guneh kirim
û min sûc kir, lê belê van mîhan,
wan çi kirin? Ez hewînê dikim,
bila destê te li dijî min û li dijî
mala bavê min be!
18 Û wê rojê Gad hat cem Dawid
û jê re got: Derkeve, li cîhê bênde-
ra Aravnayê Yebûsî, pêşkêşîgehê
ji XUDAN re deyne. 19 Û li gor
gotina Gad, Dawid mîna ku XU-
DAN emir daye derket. 20 Û
Aravna nihêrt û dît ku qiral û
qûlên wî berbi wî ve tên û ji qiral
re, bi ser rû heta erdê ve xwar bû.
21 Û Aravna got: Çima efendiyê
min qiral ji vî qûlê xwe re hat? Û
Dawid got: Bona ku ji XUDAN re
pêşkêşîgehê ava bikim, ez hatim
ku cîhê bêndera te ji te bistînim

ku bila weba ji ser netewê ve bête
rakirin. 22 Û Aravna ji Dawid re
got: Bila efendiyê min qiral, tiştê
ku di çavê wî de qenc e rahêle[1] û
pêşkêşiyê pêşkêş bike; a vay, bona
pêşkêşîkirina şewitandinê ganêr û
bona ku bibin êzing cercere û taxi-
mên ganêran; 23 ya qiral, Aravna
vana hemûyan dide qiral! Û Arav-
na ji qiral re got: Bila Xwedayê te
XUDAN ji te razî be! 24 Û qiral ji
Aravna re got: Na, lê belê ez ê mu-
heqeq bi berdêlekê ji te bistînim
û ez ji Xwedayê xwe XUDAN
re pêşkêşiyên şewitandinê yên ku
bêberdêl ketiye destê min[2], pêşkêş
nakim. Û Dawid cîhê bênderê û
gayan bi pêncî şekel zîvî ve sitend.
25 Û Dawid li wir, ji XUDAN re
pêşkêşîgehekê ava kir û pêşkêşiyên
şewitandinê û pêşkêşiyên xweşiyê
pêşkêş kir. Û XUDAN, duayên
bona welêt qebûl kir û weba ji ser
Îsraêlê ve hate rakirin.

[1] An ji: Bistîne.

[2] An ji: Bi ne tu tişteki ketiye destê min.

# 1. QIRALAN

*Pêşgotin*

Li Îsraêlê dîroka qiraletiyê bi Pirtûkên Dawid destpêdike û di Pirtûka 1. Qiralan de dom dike. Em dikarin Pirtûkê bi sê beşî ve cuda bikin:

1. Li ser Îsarêlê qiralbûyîna Silêman û mirina bavê wî Dawid
2. Qiraletiya Silêman û karên ku kirine, bi taybetî jî perestgeha li Orşelîmê ava kiriye.
3. Du parî bûna qiraletiyê ya bi navê bakur (Îsraêl) û başûr (Cihûda) û heta B.Z. sedsala 9'an dîroka qiralên ku serweriyê li qiraletiyê kirine.

Di Pirtûkên 1. û 2. Qiralan de her qiral li gor dilsoziya xwe yî Xwedê tête nirxandin. Serfiraziya Netewî, bi vê dilsoziyê ve girêdayî ye, pûtperestî û li dijbûyîna dilsoziyê, mîna pêşengên bêtariyê têne dîtin. Qiralên Bakur li dijî dijwariyan çawa ku bi Xwedê re dilsoz namînin û rastî binketinê tên, qiralên başûr cîh bi cîh hîn jî bi ser ve dikevin.

Bûyerên girîng yên di Pirtûkê de ne, îkazên Xwedê ji qiralên mêrxas re, li dijî pûtperestî û bêîtaetiyê ne. Bi taybetî jî çîroka şerê ku Êlyas bi peyxamberên Baal re kiriye cîhek girîng digire (Birra 18.)

Kitêbên 1. û 2. Qiralan; di Septuagînta de wekî 3. û 4. qiralan têtе zanîn.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:12 | Dawiya qiraletiya Dawid |
| 2:13-46 | Qiralbûna Silêman |
| 3:1-11:43 | Qiraletiya Silêman |
| a. 3:1-4:34 | Salên qiraletiya wî yên pêşiyê |
| b. 5:1-8:66 | Avakirina Perestgehê |
| c. 9:1-11:43 | Salên dawîn ên qiraletiya wî |

| | |
|---|---|
| 12:1-22:53 | Qiraletiyê ku Dabeşiyane |
| a. 12:1-14:20 | Serîhildana eşîrên li Bakur in |
| b. 14:21-16:34 | Qiraletiyên Cihûda û Îsraêlê |
| c. 17:1-19:21 | Êlyas Peyxamber |
| ç. 20:1-22:40 | Ahabê qiralê Îsraêlê |
| d. 22:41-53 | Yehoşafatê qiralê Cihûda û Ahazyayê qiralê Îsraêlê |

*Salên Qiral Dawid yên dawîn*

1 Û qiral Dawid kal bûbû û di temenê de pêş ve çûbû û wî bi kincan ve nuxumandin, lê belê germ nebû. 2 Û qûlên wî jê re gotin: Bila bona efendiyê me qiral, li qîzekî ciwan bête gerîn û bila ew li cem qiral bisekine û lê binêre û bila di hêmbêza te de rakeve ku efendiyê me qiral germ bibe! 3 Û di hemû sînorên Îsraêlê de li pîrekek xweşik û ciwan geriyan û Abîşaga Şûnemî dîtin û wê ji qiral re anîn. 4 Û pîreka ciwan zehf xweşik bû û li qiral nihêrt û xizmetê jê re kir; lê belê qiral bi wê nizanîbû[1].

*Adoniya xwe mîna Qiralekî dide bang kirin*

5 Û Adoniyayê lawê Haggît, bi gotina: Ez ê bibim qiral! xwe bilind kir û ji xwe re erebe û hespan û bona ku li pêşiya wî bazdin pêncî kesî amade kir. 6 Û bavê wî, bi gotina: Ma çima te wusa kir? tu carî dilê wî nehiştibû û ew jî, zilamek xuyanîbûna wî zehf xweşik bû û ew li pêy Abşalom hatibû dinê. 7 Û bi Yoabê lawê Tsaroya û bi kahîn Abîatar re axifî û vana bi pêy Adoniya ketin û alîkariyê bi wî re kirin. 8 Lê belê kahîn Tsadok û Benayayê lawê Yehoyada û peyxamber Natan û Şîmeyî û Reyî û egîdên Dawid, ne bi Adoniya re bûn. 9 Û Adoniya, li cem kevirê Tsoheletê, yê ku nêzîkî En-Dogelê yî mîh û ganêran û heywanên qelew qurban kir û bangî hemû birayên xwe, lawên qiral û qûlên qiral û hemû zilamên Cihûda kir; 10 lê belê bangî peyxamber Natan û Benaya û egîdan û birayê xwe Silêman nekir.

*Silêman bi Qiraletî tê bang kirin*

11 Û Natan, bi dayika Silêman Bat-Şebayê re axifî û got: Adoniyayê

[1] Bi wê re nebû, an jî: Bi wê re nezewiciya.

lawê Haggît qiraletiyê dike, ma te
nebihîstiye? Û efendiyê me Dawid
pê nizane. 12 Û niha were, ez rica
dikim, bona ku tu canê xwe û canê
lawê xwe Silêman xelas bikî, ez
şîretekê bidim te. 13 Here û bike-
ve cem qiral Dawid û jê re bibêje:
Efendiyê min qiral, ma te bi gotina:
Dê lawê minî rasteqîn Silêman, li
pêy min qiraletiyê bike û li texta
min rûne sondê neda cariya xwe? Û
ma çima Adoniya qiraletiyê dike?
14 A vay, gava hîn tu bi qiral re
axaftinê bikî, ez ê jî li pêy te bike-
vim û gotinên te tesdîq bikim.
15 Û Bat-Şeba ket odê, cem qiral
û qiral zehf kal bûbû û Abîşaga
Şûnemî ji qiral re xizmetê dikir.
16 Û Bat-Şeba xwar bû û li ber
qiral xwe avêt erdê û qiral: Çiyî
te heye? got. 17 Û jê re got: Efen-
diyê min, te bi gotina: Dê lawê
minî rasteqîn Silêman, li pêy min
qiraletiyê bike û li texta min rûne,
bona mafê XUDAN Xwedayê te
sondê da cariya xwe. 18 Û a vay,
niha Adoniya qiraletiyê dike û
tu, efendiyê min qiral, tu bi vêya
nizanî 19 û gellek gayan û hey-
wanên qelew û mîhan qurban kir
û bangî hemû lawên qiral û kahîn
Abîatar û serokê artêşê Yoab ki-
rin; lê belê bangî qûlê te Silêman
nekir. 20 Û tu, efendiyê min qiral,
bona ku tu eşkere bike, ka li pêy te
kî li texta efendiyê min qiral rûne,
çavên hemûya Îsraêlê li ser te ne.
21 Ya na, dê wusa bibe ku, gava
efendiyê min qiral bi bapîrên xwe
re rakeve, ez û lawê min Silêman,
em ê bisûc bên hesibandin.
22 Û a vay, hîn ew bi qiral re
diaxifî, peyxamber Natan hat.
23 Û bi gotina: A vay, peyxamber
Natan; ji qiral re gîhand. Û gava
hat hember qiral li ber qiral, li ser
dev xwe avêt erdê. 24 Û Natan got:
Efendiyê min qiral, ma te qet: Dê li
pêy min Adoniya qiraletiyê bike û
ew ê li textê min rûnê gotiye? 25 Ji
ber ku ew îroj daket û gellek gayan
û heywanên qelew û mîhan qurban
kir û bangî hemû lawên qiral û
serokên artêşê û kahîn Abîatar kir û
a vay, li ber wî dixwin û vedixwin
û: Bijî qiral Adoniya! dibêjin.
26 Lê belê bangî min, ev qûlê te
û kahîn Tsadok û Benayayê lawê
Yehoyada û bangî qûlê te Silêman
nekir. 27 Gelo ev kar, ji aliyê
efendiyê min qiral ve bû û efendiyê
min te ji qûlên xwe re negot, ka li
pêy te kî li texta te rûne?
28 Û qiral Dawid bersivê da û: Ji
min re bangî Bat-Şebayê bikin!
got. Ew jî hate ber qiral û li ber wî
sekinî. 29 Û qiral sondê da û got:
Bona mafê XUDANê ku zindî ye,
yê ku canê min ji hemû tengasiyan
xelas kiriye, 30 çawa ku bona mafê
XUDAN Xwedayê Îsraêl bi rastî,
bi gotina: Dê li pêy min muheqeq
lawê te Silêman qiraletiyê bike
û dê ew li dêvla min li texta min

rûnê! sondê ji te re dabim, bi rastî,
ez ê îro jî wusa bikim. 31 Û Bat-
Şeba ji qiral re xwar bû û bi ser rû
xwe avêt erdê û got: Bila efendiyê
min qiral Dawid abadîn bijî!
32 Û qiral Dawid got: Ji min re
bangî kahîn Tsadok û peyxamber
Natan û Benayayê lawê Yehoya-
da bikin! Û hatin cem qiral. 33 Û
qiral ji wan re got: Qûlên efendiyê
xwe bigirin cem xwe û lawê min
Silêman li qantirê min siwar bikin
û wî daxînin Gîhonê 34 û li wir
bila kahîn Tsadok û peyxamber
Natan, li ser Îsraêlê bona qiraletiya
wî, wî mesh bikin û li boriyê bixin
û: Bila bijî qiral Silêman! bibêjin.
35 Û hûn ê li pêy wî derkevin û
ew ê were û li texta min rûnê; ji
ber ku, dê li dêvla min bibe qiral
û li ser Îsraêl û li ser Cihûda wî bi
qiral bûnê wezîfedar kirim! 36 Û
Benayayê lawê Yehoyada bersivê
da qiral û got: Amîn! bila XU-
DAN Xwedayê efendiyê min qiral
jî wusa bibêje. 37 XUDAN çawa
bi efendiyê min qiral re bûye, bila
bi Silêman re jî wusa bibe û bila
texta wî ji texta efendiyê min qiral
Dawid re mezintir bike!
38 Û Kahîn Tsadok û peyxamber
Natan û Benayayê lawê Yehoyada
û Keretiyan û Peletiyan daketin
û Silêman li qantirê qiral Dawid
ve siwar kirin û wî birin Gîhonê.
39 Û kahîn Tsadok ji Çadirê, qi-
loçê rûn rahişt û Silêman mesh
kir. Û li boriyê xistin û hemûya
netewê: Bijî qiral Silêman! go-
tin. 40 Û hemûya netewê li pêy
wî derketin û netewe li zurneyan
xistin û bi kêfxweşiyek mezin şa
bûn û ji dengên wan erd lerizî.
41 Û dema Adoniya û hemû bang-
kiriyên ,ku li cem wî bûn, gava
xwarina xwe qedandin bihîstin. Û
gava Yoab dengê boriyê bihîst got:
Ev galegala ku ji bajêr ve tê çî ye?
42 Hîn wî digot, a vay, Yonatanê
lawê kahîn Abîatar hat û Adoniya
got: Bikeve hundir; ji ber ku tu zi-
lamekî egîd î û mizgînê tîne. 43 Û
Yonatan bersivê da û ji Adoniya
re got: Bi rastî, efendiyê me qi-
ral Dawid, Silêman kir qiral 44 û
qiral, kahîn Tsadok û peyxamber
Natan û Benayayê lawê Yehoya-
da û Keretiyan û Peletiyan bi wî
re şandin û wî li qantirê qiral ve
siwar kirin 45 û kahîn Tsadok û
peyxamber Natan, li Gîhonê wî
bi qiraletî mesh kirin û ji wir bi
kêfxweşiyê derketin û çingînî bi
bajêr ve ket. Dengê ku we bihîsti-
ne ev e. 46 Him jî Silêman li ser
texta qiraletiyê rûdine. 47 Qûlên
qiral jî, bona efendiyê me qiral
Dawid pîroz bikin hatin û gotin:
Bila Xwedayê te navê Silêman ji
navê te qenctir bike û bila texta
wî ji texta te mezintir bike! û qi-
ral li ser livînê xwar bû. 48 Him
jî qiral wusa got: Îro hîn bi çavên
xwe dibînim, XUDAN Xwedayê

Îsraêl, yê ku li ser texta min, yekî
rûdine dayiye bila pîroz be!
49 Û hemû bangkiriyên Adoniya
tirsiyan û rabûn û her kes bi rêya
xwe ve çûn. 50 Û Adoniya ji ber
Silêman tirsiya û rabû û çû û bi qi-
loçên pêşkêşîgehê ve girt. 51 Û ji
Silêman re gîhandin û jê re gotin:
A vay, Adoniya ji qiral Silêman
ve ditirse û a vay, bi gotina: Bila
qiral Silêman îro sondê ji min re
bixwe ku dê vî qûlê xwe bi şûr
ve nekuje! bi qiloçên pêşkêşîgehê
ve zeliqî. 52 Û Silêman got: Ger
nîşan bide ku ew zilamekî mêrxas
e, dê tenê mûyekî porê wî jî neke-
ve erdê; lê belê ger di wî de xerabî
bête dîtin, dê bimire! 53 Û qiral
Silêman şand û wî ji pêşkêşîgehê
ve daxistin. Û hat û ji qiral Silê-
man re xwar bû û Silêman jê re:
Here mala xwe! got.

*Wezîfeyên ku Dawid dide Silêman*

2 Û rojên ku dê Dawid bimire
nêzîk bû û ji lawê xwe Silêman
re emir kir û got: 2 Ez bi rêya ku
hemûya dinê tê de diçe diçim; tu
xwurt be û mêr be; 3 bona ku tu di
her karê ku dike de û li her aliyê ku
te berê xwe dayiye bihîkmet be, li
gor ya ku di zagona Mûsa de hati-
ye nivîsandin, bona ku tu di rêya
XUDAN Xwedayê xwe de bimeşî;
û bi zagonên wî û emirên wî û da-
raziyên wî û şahdeyiyên wî bigire
ku, 4 bila gotina XUDAN, ya ku
di derheqê min de: Ger zarokên te
bi hemûya dilên xwe û bi hemûya
canên xwe, bona ku di pêşiya min
de bi dilsozî bimeşin balkêşiyê li
rêya xwe bikin, dê ji texta Îsraêlê,
ji te mêrek kêm nebe, gotibû; li
cîh bimîne. 5 Ya ku Yoabê lawê
Serûya bi min kiriye, belê, ya ku
bi her du serokên artêşa Îsraêlê,
bi Abnerê lawê Nerîn û Amasayê
lawê Yeter re kiriye, tu jî dizanî;
di dema aşîtiyê de bi rijandina
xwîna cengê û bi lêkirina ku xwî-
na cengê li şûtika ku li pişta xwe
girêdabû û di hundirê çaroxên ku
di lingên wî de bûn lêkirinê wan
kuştin. 6 Û tu, li gor hîkmeta xwe
bike û bila serê wî yê sipî bûyî, bi
xweşiyê danekeve warê miriyan.
7 Lê belê xêrê nîşanî lawên Barzîl-
layê Gîleadî bide û bila di nava
yên ku ji sifra te xwarinê dixwin
de bin; ji ber ku gava ez ji birayê
te Abşalom reviyam ew wusa ha-
tin cem min. 8 Û a vay, Şîmeiyê
lawê Gerayê Benyamînî, ê ku ji
Bahûrîmê yî li cem te ye; roja ku
ez çûm Mahanaîmê wî bi naleta
giran, naletê li min kir; lê belê li
Urdunê, bona ku pêrgîniyê li min
bike daket û min jê re, bi gotina:
Ez bi şûr ve te nakujim bona mafê
XUDAN sondê dam. 9 Û niha wî
bêsûc negire, ji ber ku tu zilamekî
bi zanyar î û tu dizanî ka tuyê pê çi
bikî û tuyê serê wî yê sipî bûyî, bi
xwînê daxînî warê miriyan.

*Mirina Dawid*

10 Û Dawid, bi bapîrên xwe re ra-
ket û li bajarê Dawid hate binerd
kirin. 11 Û rojên ku Dawid li ser
Îsraêlê qiraletiyê kiribû çel sal
bûn; heft salî li Hebronê qiraleti-
yê kir û sîh û sê sal li Orşelîmê qi-
raletiyê kir. 12 Û Silêman li texta
bavê xwe Dawid ve rûnişt û bin-
geha qiraletiya wî zehf bihêz bû.

*Mirina Adoniya*

13 Û Adoniyayê lawê Hagît, hat
cem diya Silêman Bat-Şebayê. Û
wî got: Ma tu bi aşitiyê tê? Û got:
Bi aşitiyê. 14 Û wî got: Tiştê ku ez
ji te re bibêjim heye. Û wê got: Ka
bibêje. 15 Û wî got: Tu jî pê dizane
ku qiraletî ya min bû û bona ku ez
qiraletiyê bikim, hemûya Îsraêlê
berê xwe dabûn min; lê belê qira-
letî hate zivirandin û bû ya birayê
min; ji ber ku ji aliyê XUDAN ve
ya wî bû. 16 Û niha xwestekek
min ji te heye; min vala venegerî-
ne! Û wê jê re got: Bibêje. 17 Û
wî got: Ez rica dikim, ji qiral Silê-
man re bibêje, ji ber ku ew ji te re
nabêje na, bila Abîşaga Şûnemî bi
jinitî bide min. 18 Û Bat-Şebayê
got: Belê, ez ê bona te ji qiral re
bibêjim.
19 Û Bat-Şeba, bona ku ji bo
Adoniya ji qiral Silêman re bi-
bêje, çû cem wî. Û qiral, bona
pêrgîniya wê rabû ser pêlan û
jê re xwar bû û di texta xwe de
rûnişt û bona dayika qiral jî tex-
tekê da danîn û dayika wî li aliyê
wî yî rastê rûnişt. 20 Û wê got:
Xwestekek minî biçûk ji te heye;
min vala venegerîne! Û qiral jê
re got: Bixwaze, dayika min; ji
ber ku ez nikarim te vala vegerî-
nim. 21, Û wê got: Bila Abîşaga
Şûnemî ji birayê te Adoniya re, bi
jinitî bête dayîn! 22 Û qiral Silê-
man bersivê da û ji dayika xwe re
got: Ma tu bona çi ji Adoniya re
Abîşaga Şûnemî dixwazî? Qirale-
tiyê jî bona wî bixwaze; ji ber ku
ew birayê minî ji min mezintir e;
him bona wî û him jî bona kahîn
Abîatar û Yoabê lawê Serûya bi-
xwaze! 23 Û qiral Silêman, bona
mafê XUDAN sondê xwar û got:
Ger Adoniya, vê gotinê li hember
canê xwe negotibe, bila Xwedê
wusa û jê zêdetir bi min re bike!
24 Û niha bona mafê XUDANê
ku zindî ye, ê ku min zeximandi-
ye û min li texta bavê min Dawid
ve daye rûniştin û mîna ku gotiye,
xanedanekê ji min re çêkiriye, dê
îro Adoniya muheqeq bête kuştin!
25 Û qiral Silêman, bi destê Be-
nayayê lawê Yehoyada re şand û
lêxist û ew mir.

*Abîatar bi sirgûnê ve tête şandin û mirina Yoab*

26 Û qiral, ji kahîn Abîatar re got:
Here Anatotê, zeviyên xwe; ji ber
ku tu zilamekî kuştinê li xwe heq

kiriyî ye; lê belê ez nikarim di vê
demê de te bukujim; ji ber ku te li
pêşiya bavê min Dawid, Sindoqa
Xudan, XUDAN kişand û ji ber
ku, di hemû karên ku bavê min
zehmetê kişandiye de, te jî zehmetê
kişandiye. 27 Û Silêman, bona go-
tina XUDAN ya li ser mala Elî, li
Şîloyê gotiye bîne cîh Abîatar ji
kahîntiya XUDAN ve avêt.
28 Û nûçe gîhaşt Yoab; ji ber ku
Yoab li gor Abşalom nekiribû;
lê belê li gor Adoniya kiribû. Û
Yoab reviya Çadira XUDAN û bi
qiloçê pêşkêşîgehî girt. 29 Û ji qi-
ral Silêman re gotin: Yoab reviya
Çadira XUDAN û a vay, li cem
pêşkêşîgehê ye. Û Silêman bi go-
tina: Here, li wî bixe! Benayayê
lawê Yehoyada şand. 30 Û Bena-
ya hat Çadira XUDAN û jê re got:
Derkeve! qiral wusa emir daye. Û
wî got: Na; ez li vir bimirim. Û
Benaya ji qiral re, bi gotina: Yoab
wusa got û bi vî awayî bersivê da
min, agahiyê şand. 31 Û qiral jê re
got: Mîna gotina wî bike, lêxe û
binerd bike ku, tu xwîna ku Yoab
bêyî sedem rijandiye ji ser min û
ji ser mala bavê min rake. 32 Û
dê XUDAN xwîna wî li ser serê
wî ve vegerîne, ji ber ku wî, li du
zilamê ji xwe hîn jî salihtir û hîn jî
qenctir, li serokê artêşa Îsraêlê Ab-
nerê lawê Nerîn û li serokê artêşa
Cihûda Amasayê lawê Yeter xist
û bi şûr wan kuşt û bavê min Da-
wid pê nizanîbû. 33 Bi vî awayî,
dê xwîna wan li ser serê Yoab û li
ser serê nîjada wî abadîn bizivire;
lê belê dê ji aliyê XUDAN ve ji
Dawid û nîjada wî re û ji mala wî
û ji texta wî re abadîn xweşî bibe!
34 Û Benayayê lawê Yehoyada
derket û lê xist û wî kuşt û li çolê,
di mala xwe de hate binerd kirin.
35 Û qiral li dêvla wî, Benayayê
lawê Yehoyada danî serê artêşê
û qiral, kahîn Tsadok danî cîhê
Abîatar.

*Mirina Şîmeî*

36 Û qiral şand û bangî Şîmeî kir
û jê re got: Li Orşelîmê ji xwe re
xaniyekê çêbike û li wir rûnê û ji
wir dernekeve tu derê. 37 Û roja
ku tu derket û te newala Kîdronê
derbas kir, bi rastî bizanibe ku tuyê
muheqeq bête kuştin; dê xwîna te
li ser serê te be. 38 Û Şîmeî ji qiral
re got: Ev gotina qenc e, efendiyê
min qiral çawa gotibe dê qûlê te
wusa bike. Û Şîmeî gellek deman
li Orşelîmê rûnişt.
39 Û wusa bû ku, paşî sê salî du
qûlên Şîmeî, reviyan cem Akîşê
lawê Maakayê qiralê Gatê. Û bi
gotina: A vay, qûlên te li Gatê ne!
agahî ji Şîmeî re hate dayîn. 40 Û
Şîmeî rabû û palanê li kerê xwe
xist û çû Gatê, Akîşê, bona ku li
qûlên xwe bigere û Şîmeî çû û
qûlên xwe ji Gatê anî. 41 Û çûyîn
û hatina Şîmeî ya Gatê ji Silêman

re gotin. 42 Û qiral şand û bangî Şîmeî kir û jê re got: Ma min bi mafê XUDAN sondê ji te re neda dayîn? Û ji te re bi gotina: Roja ku tu derket û li der û hêlê geriya, bi rastî bizanibe ku tuyê muheqeq bête kuştin bi qencî tembih nekirim? Û te jî ji min re: Gotina ku bihîstime qenc e got. 43 Wê çaxê, çima te bi sonda XUDAN û bi emrê ku dabûm te nekir? 44 Û qiral ji Şîmeî re got: Tu bi hemû xerabiya ku te ji bavê min Dawid re kiriye dizane, dilê te jî pê dizane û dê XUDAN xerabiya te bi serê te ve vegerîne! 45 Lê belê dê qiral Silêman bibe pîroz û texta Dawid abadîn bête zexm kirin. 46 Û qiral emir da Benayayê lawê Yehoyada û derket û lê xist û ew mir. Û qiraletî di destê Silêman de hate zeximandin.

*Silêman ji Xwedê ve zaniyariyê dixwaze*

2.Dîr 1,1-13

3 Û Silêman bi Fîrawûnê qiralê Misirê re bû meriv û qîza Fîrawûn rahişt û heta ku ava kirina mala xwe û mala XUDAN û bi dorûber dîwarê Orşelîmê qedand, pîrekê anî bajarê Dawid. 2 Lê netewe li cîhên bilind ve qurbanê dikirin, ji ber ku heta wê rojê, xaniyek ji navê XUDAN re hatiye çêkirin tunebû. 3 Û Silêman di zagonên bavê xwe Dawid de dimeşiya û ji XUDAN hez dikir; lê belê li cîhên bilind qurbanê dikirin û buhurê dişewitandin. 4 Û qiral bona ku qurbanê bike çû Gîbeonê; ji ber ku ew der, mezinê cîhên bilind bû; Silêman li ser wê pêşkêşîgehê, hezar serî pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş kir. 5 XUDAN li Gîbeonê, şevê di xewnê de ji Silêman re hate xuyanîbûn û Xwedê got: Ez çi bidim te, bixwaze. 6 Û Silêman got: Te ji qûlê xwe, bavê min Dawid re li gor ku li ber te bi rasteqînî û bawerî û bi te re, bi rastiya dil re meşiya xêrekê mezin kir û mîna ku îro wusa ye, te bona ku li texta wî rûnê, ji wî re bi dayîna lawekî, bona wî vê xêra mezin veşart. 7 Û niha, ya Xwedayê min XUDAN, te qûlê xwe, li dêvila bavê min Dawid kir qiral, lê ez lawikek biçûk im; bi derketin û ketinê nizanim. 8 Û qûlê te di nava netewa ku te bijartiye de ye, neteweyek mezin ya bi zêdeyî nikare bête hesibandin û jimartin. 9 Niha, bona ku daraziyê ji netewa te re bike, dilekî bi fêhmkarî bide qûlê xwe ku, ez navbera qencî û xerabiyê bikaribim cihê bikim; ji ber ku, ma kî dikare ji vê neteweya te yî mezin re daraziyê bike?

10 Û ev gotina, di çavê XUDAN de qenc hate xuyanî kirin, ji ber ku Silêman ev tiştî xwest. 11 Û Xwedê jê re got: Madem ku te vî tiştî xwest û bona xwe bi zêdeyî roj

nexwest û bona xwe dewlemendi-
yê nexwest, canên neyarên xwe jî
nexwest, lê bona cihê kirina rasti-
yê ji xwe re te fêhmkariyê xwest;
12 a vay, li gor gotina te kirim; a
vay, dilê bi zanyarî û bi fêhmkarî
dam te; wusa ku, berî te mîna te
tu kes nebûye û dê li pêy te, yê
mîna te dernekeve. 13 Û tiştê ku te
nexwest jî dam te, him dewlemen-
dî him jî mezintî; wusa ku, dê di
hemû rojên te de, di nava qiralan
de yê mîna te tune be. 14 Û bona
ku bi girtina zagon û emirên min,
ger tu jî mîna ku bavê te Dawid di
wan de meşiyaye, di rêyên min de
bimeşe, wê gavê ez ê temena te
dirêj bikim! 15 Û Silêman hişyar
bû û a vay, xewn bû û hat Orşelîmê
û li ber Sindoqa XUDAN ya
Peymanê sekinî û pêşkêşiyên
şewitandinê pêşkêş kirin û ziya-
fetê da hemû qûlên xwe.

*Silêman bi awayekî zaniyarî daraz dike*
Zeb 72,1-4

16 Û du pîrekê fahîşe hatin cem
qiral û li ber wî sekinîn. 17 Û ji
pîrekan yekê got: Eman efendiyê
min! ez û vê pîreka em li malekê
rûdinin û dema ez li malê bi wê
re bûm, zarokekî anîm dinê. 18 Û
wusa bû, paşî ku zarok anîm dinê,
sê rojê din, vê pîreka jî zarok anî
dinê û em pev re bûn; li malê li cem
me tu kesî biyan tune bû, lê em
her du li malê bûn. 19 Û zarokê vê
pîrekê şevê miriye, ji ber ku li ser
wî raketiye. 20 Û nîvê şevê rabû û
dema cariya te radiket, lawê min
ji cem min rahiştiye û wî xistiye
himbêza xwe û zarokê xwe yî
mirî jî xistiye himbêza min. 21 Û
gava sibehê, bona ku zarokê xwe
bimêtînim rabûm, a vay, miribû;
lê belê gava sibehê lê nihêrtim,
a vay, ew ne lawê ku min aniye
dinê bû! 22 Û pîreka din got: Na!
lê belê yê ku zindî ye lawê min û
yê ku miriye lawê te ye. Û ya din
got: Na! lê belê yê miriye lawê te
û yê ku zindî ye, lawê min e. Li
ber qiral wusa digotin.
23 Û qiral got: Yek: Yê ku zindî
ye, lawê min û yê ku miriye lawê
te ye dibêje û ya din: Na! lê belê
yê ku miriye lawê te ye û yê ku
zindî ye, lawê min e, dibêje! 24 Û
qiral got: Şûrekî ji min re bînin!
Û şûrekî anîn ber qiral. 25 Û qiral
got: Zarokê ku zindî ye bikin du
parî û nêvî bidin yekê û nêviyê
wî jî bidin ya din! 26 Û pîreka ku
lawê wê zindî ye bi qiral re axifî
– ji ber ku bona lawê xwe dilê wê
dişewitî – û got: Eman efendiyê
min! zarokê ku zindî ye bidin wê;
emman wî nekujin! Lê belê ya
din got: Bila ne yê min û ne jî yê
te be; bikin du parî! 27 Wê gavê
qiral bersivê da û got: Zarokê
ku zindî ye bidin vêya û nebe ku
hûn bikujin! dayika wî ev e. 28 Û
hemûya Îsraêlê, daraziya ku qiral

dayiye bihîstin û ji qiral tirsiyan;
ji ber, dîtin ku pê re bona darazki-
rinê, hîkmeta Xwedê heye.

*Wezîfedarên Silêman*

4 Û qiral Silêman li ser hemûya
Îsraêlê qiral bû. 2 Serokên wî
jî vana bûn: Azaryayê lawê Tsa-
dok, kahîn; 3 Elîhoref û Ahiyayê
lawên Şîşe katip[1]; Yehoşafatê
lawê Ahîlûd bûyernivîs 4 û Bena-
yayê lawê Yehoyada li serê artêşê
bû û Tsadok û Abîatar kahîn bûn
5 û Azaryayê lawê Natan, li serê
keyayan bû û Zabûdê lawê Na-
tan vezîr û hevalbendê qiral bû
6 û Ahîşar li ser maliyan bû û
Adonîramê lawê Abda, li ser sux-
rekaran bû.
7 Û li ser Îsraêlê donzdeh keyayên
Silêman hebûn û ji qiral re û ji
gelên mala wî re zewêde peyda
dikirin; ji her yekî re, di salê de
mehekê zewêde peyda kirin diket.
8 Û navên wan ev bûn: Li çiyayi-
ya Efrayîm Ben-Hûr; 9 li Makaz
û Şaalbîmê û li Beyt-Şemeşê û
li Elon-Beyt-Hananê Bendeker;
10 li Arûbbotê Ben-Hesed, Soko û
hemûya warê Heferê aidî wî bûn;
11 di hemûya zozana Dorê de Ben-
Abînadab, Tafata qîza Silêman
jina wî bû. 12 Li Taanak û Megîd-
doyê û li hemûya Beyt-Şeana li
cem Zareta ya ku li bin Yîzreêlê
yî; ji Beyt-Şeanê Abel-Meholaya,
ji wêdetira Yokmeamê Baanayê
lawê Ahîlûd; 13 li Ramot-Gîleadê
Ben-Geber, bajarên Yaîrê lawê
Manaşşe yê ku li Gîleadê ye û
devera Argobê ya ku li Başanê yî,
şêst bajarên mezin ên ku bi zen-
dên tunc, û bi dîwêr aidî wî bûn;
14 li Mahanaîmê Ahînadabê lawê
Îddo; 15 li Naftaliyê Ahîmaats,
viya jî Basamata qîza Silêman ji
xwe re bi jinitî rahişt; 16 li Aşer
û Bealotê Baanayê lawê Hûşay;
17 li Îssakarê Yehoşafatê lawê
Parûa; 18 li Benyamînê Şîmeiyê
lawê Ela; 19 li warê Gîleadê, li
welatên Sîhonê qiralê Amoriyan
û Ogûnê qiralê Başanê, Geberê
lawê Ûrî û li welêt keyayê tekane
viya bû.
20 Cihûda û Îsraêl, bi pirranî, mîna
qûma li qeraxa behrê ne, pirr bûn;
di xwarin û vexwarinê de û di
kêfxweşiyê de bûn. 21 Û Silêman
ji çemê Feratê, heta warê Filisti-
yan û li ser hemû welatên ku heta
sînorê Misirê bûn serweriyê ajot;
wan nerxê anîn û di hemû rojên te-
mena xwe de qûlitiyê ji Silêman re
kirin. 22 Û xwarina rojekî ya mala
Silêman sîh olçek[2] arvanê zirav û
şêst olçek arvan, 23 deh gayê qelew
û ji mêrgan bîst ga û xeyni askan û
xezalan û xezala stewr û mirîşkên
qelew, sed heb mîh bûn. 24 Ji ber

[1] Nivîsvan.

[2] Li rasteka menan binêrin.

ku, li aliyê dinî çemê Feratê, ji Tîf-
sahê heta Gazayê li hemû derdorê,
li ser hemû qiralên ku li aliyê dinî
çem in, serweriyê dajot û li dora
wî, bi her alî re aşîtbûna wî hebû.
25 Û di hemû rojên Silêman de ji
Danê heta Beer-Şebayê Cihûda û
Îsraêl, her kes di bin mêwa xwe
û darê hijîra xwe de, bi xweşiyê
rûniştin. 26 Û bona erebeyên cengê
ên Silêman, di çel hezar liqên axûr
de hespên wî hebûn û donzdeh
hezar suwarên wî hebûn. 27 Û ew
keyana bona qiral Silêman û bona
hemûyên ku tên sifra qiral Silêman,
her yek di meha xwe de zewêde
peyda dikirin. 28 Û her kes li gor
ku jê re hatiye emir kirin, hespan û
bona hespên wanî siwarbûnê ceh û
ka dianîn cîhên ku ew lê ne.

*Zaniyariya Silêman ya bêmînak*

29 Û Xwedê, mîna qûma ku li
qeraxa behrê ye, bi zêdeyî hîk-
met û fêhmkarî û firehiya dil da
Silêman. 30 Û hîkmeta Silêman,
ji hîkmeta hemû lawên rojhilatê û
ji hîkmeta hemû Misirê seretatir
bû. 31 Ji ber ku ji hemû mirovan,
ji Eytanê Ezrahî û ji Darda û Kal-
kol û Hemanê ku lawên Mahol in,
hîn jî bihîkmet bû û bi dorûber di
hemû neteweyan de nav û dengiya
wî hebû. 32 Û sê hezar methelok
got û qesîdeyên wî hezar û pênc
bûn. 33 Û ji darê erzê ya li Lub-
nanê yî heta gihayê zûfa yê ku
di dîwêr de digihêje, di derheqê
hemû daran de got û di derheqê
heywanan û civîkan û tiştên ku bi
xwêr ve diçin de û di derheqê ma-
siyan de jî got. 34 Û bona guhdarî
kirina hîkmeta Silêman ji hemû
neteweyan, ji hemû qiralên dinê
ên ku di derheqê hîkmeta wî de
bihîstine zilaman dihatin.

*Amadekariya avakirina Perestgehê*

5 Û qiralê Sûrê Hîram, qûlên
xwe ji Silêman re şandin; ji
ber bihîstibû ku, li dêvila bavê wî,
wî mesh kirine; ji ber ku Hîram
her tim ji Silêman hez dikir. 2 Û
Silêman ji Hîram re şand û got:
3 Tu dizanî, heta ku XUDAN,
neyarên bavê min Dawid xist bin
pêyên lingên wî, ji ber cengên ku
li dora wî ne, bona navê Xwedayê
xwe XUDAN, xaniyekî ava nekir.
4 Lê belê niha Xwedayê min XU-
DAN ji her alî ve aramiyê da min;
ne neyar heye, ne jî bûyerek xerab
heye. 5 Û a vay, XUDAN çawa
ku bi gotina: Lawê te, yê ku ez ê
li dêvila te deynim texta te, dê ji
navê min re wî xaniyî ava bike! ji
bavê min Dawid re gotibe, ez nêt
dikim ku, ji navê Xwedayê xwe
XUDAN re, ez ê xaniyekî ava
bikim. 6 Û niha bona ku ji min
re ji Lubnanê darên erzê jêbikin,
emir bide û dê qûlên min bi qûlên
te re bin û li gor her tiştê ku tu bi-
bêjî, ez ê bona qûlên te berdêlê bi-

dim te; ji ber tu dizanî ku, di nava
me de, mîna Saydayiyan, yê ku bi
jêkirina oniyê[1] dizane nîne.
7 Û wusa bû ku, gava Hîram go-
tinên Silêman bihîst zehf kêfxweş
bû û got: XUDANê ku li ser wê
netewa mezin laweki bi hîkmet
daye Dawid bila îro pîroz be!
8 Û Hîram ji Silêman re şand û
got: Gotina ku te ji min re şandiye
bihîstim; ez ê di derheqê oniya
darê erzê û oniya serwiyê de her
xwesteka te bikim. 9 Dê qûlên
min wan ji Lubnanê daxînin
behrê û ez ê bona ku bi rêya behrê
ve herim cîhê ku te nîşan dayiyê ji
wan kelekan çêbikim û wan li wir
bidim vekirin û tuyê wan bibe û bi
xwarin dayîna maliyên min tuyê
xwesteka min temam bike. 10
Û Hîram, li gor her xwestina wî
oniya darê erzê û oniya serwiyê
da Silêman. 11 Û Silêman, bona
ku maliyên wî bixwin, bîst hezar
olçek genim û bîst qor[2] zeyta xa-
lis da Hîram; Silêman ji salê heta
salê bi vî awayî dida Hîram. 12 Û
mîna ku XUDAN ji Silêman re
gotibû hîkmetê da wî û di navbera
Hîram û Silêman de aşitîbûn hebû
û her du di nav xwe de peymanek
çêkirin.
13 Û qiral Silêman ji hemûya Îsraêlê
suxrekaran civand û suxrekar sîh
hezar zilam bûn. 14 Di mehê de bi
deh hezar bûnê, vana bi dor şandin
Lubnanê; mehekê li Lubnanê û du
meh li malên xwe diman û li ser
suxrekaran Adonîram hebû. 15 Û
heftê hezar zilamên bar dikişînin û
heyştê hezar zilamên Silêman ên
ku li çiyê keviran jê dikin, 16 xeynî
vana sê hezar û sê sed ser keyayên
Silêman ên serweriyê li netewa ku
di kar de duşuxulin dikin hebûn.
17 Û qiral emir da û ew bona ku
bingeha xanî bi kevirên qewartî
deynin[3], kevirên mezin, kevirên
bi qîmet jê kirin. 18 Û çêkerên[4]
Silêman û ava kirên Hîram û Ge-
baliyan wan qewartin û bona ava
kirina xanî onî û keviran amade
kirin.

*Avakirina Perestgehê*

2.Dîr 3

6 Û wusa bû ku, di çar sed û
heyştê saliya ji Misirê derke-
tina gelê Îsraêl de, di çar saliya
serweriya Silêman ya li ser Îsraêlê
de, di meha Zîvê ya ku meha du-
wem e de, dest bi ava kirina mala
XUDAN kir. 2 Û dirêjiya xaniyê
ku qiral Silêman bona XUDAN
ava kir şêst gez û firehiya wê bîst
û bilindahiya wê sîh gez bû. 3 Û
dirêjiya eywana li ber perestgeha
malê ye, li gor firehiya xanî bîst

---

1 Kereste.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Bavêjin.
4 Avakir, an jî: Hoste.

gez bû û firehiya wê li ber malê deh
gez bû. 4 Û bona xanî, şivakeyên
bi qefesan ve girtîne çêkirin. 5 Û
qatên ku bi dîwarên malê ve ne,
yên ku him bi perestgehê û him jî
bi dîwarên xanî ên ku li dora oda
navîn in çêkirin û li dora wê ode-
yên kêlekê çêkirin. 6 Qatê binî di
firehiya pênc gezî de û qatê navîn
di firehiya şeş gezî de û yê sêwem,
di firehiya heft gezî de bû; ji ber
bona ku beşt bi dîwarên malê ve
negirin, li dora dîwarên malê, li
aliyê derve serpiyan hiştin. 7 Û
gava xanî dihat ava kirin, ji ke-
virê ku di ocaxa keviran de hatiye
amade kirin hate çêkirin û gava
dihat çêkirin, di hundirê xanî de
ne dengê çakûc, ne yê bivir ne jî
dengê haletekî hesin hate bihîstin!
8 Deriyên odeyên navîn ên kêlekê
li rastê malê bûn û bi pêlikek fetla-
nek hildikişiyan qatê navîn û ji wir
jî hildikişiyan yê sêwemîn. 9 Xanî
bi vî awayî çêkir û wê qedand û
xanî bi beştên ji darê erzê û bi
textên qalind ve nuxumand. 10 Û
qatên ku li kêleka hemûya xanî ne,
bi bilindahiya her yekî pênc gezî
ava kir û wan bi oniyên darê erzê,
bi xanî ve girêdan.
11 Û vê gotina XUDAN ji Silê-
man re hat: 12 Dema tu were vî
xaniyê ku te ava kiriye, ger tu di
zagonên min de bimeşe û darazi-
yên min bikî û bona ku di hemû
emirên min de bimeşî tu bi wan
bigirî; wê gavê ez ê, gotina xwe,
ya ku ji bavê te Dawid re gotibûm,
bi te re bizexmînim. 13 Û ez ê di
nav lawên Îsraêl de rûnim û dev ji
netewa xwe Îsraêlê bernedim!
14 Û Silêman xanî ava kir û wê
qedand. 15 Û dîwarên xanî, ji
hundir bi textên ji darê erzê ne,
çêkir û ji zemînê heta dîwarên
xanî, ser wan ji hundir ve bi tex-
tan girt û zemîna xanî bi textên
serwiyê ve nuxumand. 16 Û li paş
xanî ji zemînê heta dîwarên xanî,
bi textikên darê erzê bîst gezî ava
kir; wan bi odeyên navînbûnê, bi
cîhên pîrozbûnê ji hundir ve çêki-
rin. 17 Û xanî, yanê perestgeha ku
li derveyî odeya navîn bû, çel gez
bû. 18 Û ji hundir ve, darên erzê
ên ku li ser xanî bûn, bi girêkan û
bi çîçekên ku vebûne ve hatibûn
qewartin[1]; hemû darên erzê bûn,
kevir qet nedihatin xuya kirin.
19 Û li herî hundirê xanî, bona
danîna Sindoqa XUDAN ya Pey-
manê odeyek navîn amade kir.
20 Û ji hundir ve dirêjiya odeya
navîn bîst gez û firehiya wê bîst
gez û bilindahiya wê bîst gez bû
û dora wê bi zêrê safî ve girt[2] û
dora pêşkêşîgeha ku ji darê erzê
ye jî girt. 21 Û Silêman xanî ji
hundir ve wecê xanî bi zêra safî

1 Li wan hatibûn nexşandin.

2 Wecê wê bi zêr ve nuxumand.

ve nuxumand û zencîrên zêrîn
kişand pêşiya odeya navîn û dora
wê bi zêran ve nuxumand. 22 Û
hemûya xanî bi zêran ve, wecê
hemûya xanî nuxumand; hemû
pêşkêşîgeha odeya navîn jî bi zêr
ve nuxumand.
23 Û li odeya navîn ji darê zeytûnê
du kerûbiyên ku dirêjiya wan deh
gez in çêkir. 24 Û baskek kerûbî
pênc gez bû û baskê dinî kerûbî
pênc gez bû û ji serê baskek heta
serê baskê din deh gez bû. 25 Û
kerûbiyê din deh gez bû, her du
kerûbî di şiklekî û mezinahiyekî
de bûn. 26 Bilindiya kerûbiyekî
deh gez bû, ya kerûbiyê din jî wusa
bû. 27 Û kerûbiyan xistin hundirê
xaniyê navîn û baskên kerûbiyan
şidiyabûn, wusa ku, baskê yekî
li dîwarekî û baskê kerûbiyê din
jî li dîwarê din diketin û baskên
wan di nava xanî de li hev diketin.
28 Û wî kerûbiyan bi zêr ve nu-
xumand.
29 Û li hundir û li derve, li
dorûberê hemû dîwarên xanî,
şiklên nepixandî, kerûbiyan û
darên xurmê û çîçegên vebûne
qewartin. 30 Û li hundir û li der-
ve, wecê xanî bi zêr ve dagirt[1]. 31
Û li cîhê ketina odeya navîn, ji
darên zeytûnê bazikên derî çêki-
rin û şêmûga jorîn û rewtên derî ji
pênc pariyên dîwar pariyek bûn.
32 Bi vî awayî, ji darê zeytûnê du
bazikên derî çêkirin û li ser wan
kerûbiyên nepixandî û darên xur-
mê û çîçegên vekirî qewartin û
dora wan bi zêr ve girtin û zêrê
li ser kerûbiyan û darên xurmê
raxist. 33 Li cîhê ketina perest-
gehê jî ji darê zeytûnê ji çar pa-
riyê dîwêr pariyekî rewtên derî
34 û ji darê serwiyê du bazikên
derî çêkirin û bazikek ji du pariyî
bû û li hev dihat girtin û bazikê
din jî ji du pariyî bû û li hev di-
hat girtin. 35 Û li ser kerûbiyan
û darên xurmê û çîçegên vebûne
qewartin û bi zêrên ku li gor qe-
wartinê li hev hatine anîn dor li
wan girtin. 36 Û hewşa navîn bi
sê rêz kevirên qewartî û bi rêzek
beştê darên erzê çêkir.
37 Bingeha Xaniyê[2] XUDAN,
di sala çaremîn de, di meha Zîvê
de hate avêtin. 38 Û di sala yanz-
dehan de, di meha heyştan de, di
meha Bûlê de, xanî li gor hemû
şiklê xwe û hemû aliyên xwe hate
qedandin. Bi vî awayî heft sal di
ava kirina wê de bû.

*Qesra Silêman*

7 Û Silêman sêzdeh sal xaniyê
xwe ava kir û hemûya xaniyê
xwe qedand. 2 Û xaniyê daristana
Lubnanê ava kir; dirêjî sed gez û
firehbûn pêncî gez û bilindahiya

[1] Nuxumandin.

[2] Peristgeh.

wê sîh gez bû û li ser sitûnan
beştên ji darê erzê bûnê, li ser
çar rêz sitûnên ji darê erzê bûn.
3 Û ser çel û pênc beştên ku li
ser sitûnan bûn bi dara êrzê ve
hatibûn nuxumandin; di rêzekê
de panzdeh. 4 Û beşt sê rêz bûn û
şivake hemberî şivakê bû, sê qat.
5 Û hemû derî û sitûn bi beştan ve
çar qozîk hatibûn çêkirin û şivake
li hember şivakê bû, sê qat. 6 Û
eywana sitûnan çêkir; dirêjiya wê
pêncî gez û firehiya wê sîh gez bû
û li pêşiya wan eywanek û li pêşiya
wan sitûn û şêmûg hebûn. 7 Û
eywana textê, li wir eywana ku dê
tê de daraziyan bide ava kir û rûyê
wê ji raxêrê heta tawanê bi darê
erzê ve hatibû girtin. 8 Û xaniyê
ku dê tê de rûdinê, bi hewşa ku di
aliyê hundirê eywanê de ve di yek
lêkirinê de bû. Bona qîza Fîrawûn
ya ku Silêman pê re zewicîbû,
mîna vê eywanê xaniyekî çêkir.
9 Hemûyên vana, ji hundir û der-
ve, ji bingehê heta xanî, ji kevirên
bi qîmet ên ku bi birrekê ve ha-
tine jêkirin û qewartin, ji kevirên
ku hatibûn pîvandin bûn; ji derve
heta hewşa mezin wusa bû. 10 Û
bingeh ji kevirên bi qîmet, ji ke-
virên mezin, ji kevirên deh gezî
û heyşt gezî bûn. 11 Û li ser wê,
li gor pîvanê kevirên biqîmet, ke-
virên qewartî û darê erzê hebû.
12 Mîna ku di hewşa hundir ya
mala XUDAN de û mîna eywa-
na malê, li dora hewşa mezin jî sê
rêz kevirên qewartî û rêzek beştên
darê erzê hebû.

*Wezîfa Hîram*

2.Dîr 2,12-14; 3,15-17; 4,2-6

13 Û qiral Silêman şand û ji
Sûrê Hîram da anîn. 14 Lawê
jinebiyek ji nîjada Naftaliyê
bû û bavê wî zilamek Sûrî bû,
karkerê tûncê bû û Hîram di
neqişandina hemûya karên tûncê
de bi hîkmet û fêhmkarî û huner
ve tijî bû. Û hate cem Silêman
û hemû karên wî çêkir. 15 Du
sitûnên tûncî çêkir, dirêjiya her
sitûnî hîjdeh gez bû û tayekî di
dirêjiya donzdeh gezê de li dora
her yek sitûnê dihat gerandin.
16 Û bona ku deyne ser sitûn-
an, ji tûnca rijandî du serî çêkir;
dirêjiya seriyekî pênc gez bû û
dirêjiya seriyê din jî pênc gez bû.
17 Û di seriyên ku li ser sitûnan
e torên ji karê rêsandinê ve û çe-
lengên ji karê zencîran hebûn;
bona seriyekî heft û bona seriyê
din heft. 18 Sitûnan wusa çêkir
û bona ku seriyên li ser sitûnan
e buxumîne, li ser karê torekê
bi dorûber du rêz hinaran çêkir;
bona serîkê din jî wusa çêkir.
19 Û serîkên li ser sitûnên ku li
eywanê ne karên leylankê bûn,
çar gez. 20 Û li aliyê jor jî, li ser
her du sitûnî nêzîkî niçikê biçûk
serî hebûn û li ser serîkê din, di

êzên dorûberê hinar de du sed
ûn. 21 Û sitûnan di eywana
erestgehê de çikandin û sitûna
astê çikand û navê Yakînê[1] lê
ir û sitûna çepê çikand û navê
3oazê[2] lê kir. 22 Û li serê van
itûnan karê leylankê hebû; bi vî
wayî karê sitûnan qediya.
23 Û behra rijandî ji aliyekî, heta
liyê din bi deh gezî bi avayekî
iroverî çêkir û dirêjiya wê pênc
ez bû û tayekî sîh gezî dora wê
igeriya. 24 Û kulîlkên ku ji binya
eraxa wê li dora wê pêçaye, di her
ezî de deh hebên ku bi dorûbera
ehrê girtine hebûn; kulîlk du rêz
ûn û dema hatin rijandin, pev re
van rijandin. 25 Li ser donzdeh
ayî disekinî sê heb li bakur û sê
eb li rojava û sê heb li rojhilat û
ê heb li başûrê dinihêrtin û behr li
r, bi ser wan ve bû û newqa wan
emûyan berbi hundir bûn. 26 Û di
hostek qalindiyê de bû û qeraxa
ê, mîna qeraxa tasekê mîna çîçe-
leylankê hatibû neqişandin; du
zar bat[3] avê digirt.
Û ji tûncê deh heb lingdank
kir û dirêjiya lingdankekê
gez û firehiya wê çar gez û
ndahiya wê sê gez bûn. 28 Û
êjiya lingên wê bi vî şiklî bû:
whên wê yên kêlekê hebûn û
navbera perwazan de lewhên
wê yên kêlekê hebûn 29 û di
lewheyên ku li kêleka perwaza
de bûn şêr û ga û kerûbî hebûn
û perwazên jorîn jî wusa bûn û
di binya şêr û gayan de çelengên
pençalokî hatibûn neqişandin.
30 Û çar tekerên tûncê yê her
lingî û sirniyê wanî tûnc hebûn û
sermilên çar lingên wê hebûn û li
cem her yekê bi çelengbûnê ser mil,
di bin qazanê de hatibû rijandin.
31 Û devê wê di hundirê serî de
û li jor gezek bû û li gor karê ling
devê wê girover û gezek û nîv
bû û di devê wê de jî qewartin
hebû û lewhayên wanî kêlekê
ne gilover, lê belê çar qozîk bûn.
32 Û çar teker di bin lewhayên
kêlekê de bûn, sirniyên tekeran
di lingdankê de bûn û bilindahiya
tekerekê gezek û nîv bû. 33 Û
karên tekeran, mîna karê tekerên
erebeyan bûn; sirnî û jantên wê û
tilîkên wê û hemûyên serîkên wê
hemû yên rijandî bûn. 34 Û li her
çar qozîkên lingdankê çar serpî
hebûn, sermilên lingdankê ji wê
bûn. 35 Û li ser serê lingdankê, di
firehiya nîv gezî de şikleki girover
hebû û milên li ser serê lingdankê
ne û lewhayên wê yên qiraxê
ji wê bûn. 36 Û li gor firehiya
her yekê, li cîhên milê wê ê rast
e û li lewhayên wê yên qeraxê

---

bizeximîne.
di vê de

3 Li rasteka menan binêrin.

kerûbiyan, şêran, darên xurmê û
bi dorûberê çelengan qewartin.
37 Bi vî awayî deh lingdankî çêkir;
rijandina hemûyan yek, pîvana
wan yek û şiklên wan yek bûn.
38 Û ji tûncê deh qazanî çêkir; qa-
zanekî çel batî digirt û her kazan
çar gez bû û li ser deh lingdankê,
qazanek hebû. 39 Û pênc heb li
aliyê rastê malê û pênc heb jî li
aliyê çepê malê bûnê, lingdankan
danî û behrê danî rastî malê, berbi
rojhilatê, danî ber bi başûr.
40 Û Hîram qazanan, bêran û le-
ganan çêkir. Û Hîram hemû karên
ku bona qiral Silêman, li mala XU-
DAN çêdikir qedand; 41 du sitûna
û her du giroverên ku li ser esrîkên
ku li ser sitûna ne û karên tora ên li
ser her du giroverên li ser esrîkên
ku li ser sitûna ne 42 û bona her
du toran çar sed hinarî û bona her
torê li ser her du giroverên ku li ser
esrîkên ku li ser sitûna ne du rêz hi-
naran 43 û deh lingdankî û deh qa-
zanên li ser lingdanka ne 44 û behrê
û donzdeh gayên ku di bin behrê de
ne 45 û feraxan û bêran û leganan û
hemû van taximên ku Hîram, bona
Silêman li mala XUDAN çêkiriye,
ji tûncê bi şewle bûn. 46 Qiral vana
di tejaneya Urdunê de, di axa herîk
de ya di navbera Sûkkot û Tsaretan
de ye rijand. 47 Û Silêman hemû
feraxan bêyî wezin hiştin, ji ber ku
zehf zêde bûn û li wezna tûncê ve
nehat gerandin.
48 Û Silêman hemû feraxên ku
li mala XUDAN in, pêşkêşîgeha
zêr û sifra zêrîn ya nanê aramiyê
li ser e 49 û li ber odeya navîn,
şimadankên ji zêrê safî ne, ên ku
pênc li rastê, pênc li çepê ne û
çîçekên ku ji zêrê ne û qendîlan û
maşeyan 50 û tasên ku ji zêra safî
ne û meqesan û leganan û kevçi-
yan û tableyan û him bona deriyên
xaniyê navîn, yê Cîhê Herî Pîroz
û him jî bona deriyên xanî û pe-
restgehê ji zêr, encameyan çêkir.
51 Û hemû karên ku qiral Silêman
di mala XUDAN de çêdikir qedi-
yan. Û Silêman tiştên ku bavê wî
Dawid tirxan kiriye, zîv û zêran û
taximan anî hundir û wan xist nav
xezîneyên mala XUDAN.

*Sindoqa Peymanê tînin Perestgehê*

8 Wê gavê Silêman kalepîrên
Îsraêlê û hemû seriyên nîjadan
mîrên xaniyên bapîrên lawên
Îsraêl; bona ku Sindoqa Peymanê
ya XUDAN, ji Siyona ku bajarê
Dawid e, bi jor ve bînin, li Orşelîmê,
li cem qiral Silêman civand.
2 Û hemû mêrên Îsraêlê di meha
Etaîmê de, ya ku meha heftan e,
di cejnê de, li cem qiral Silêman
civiyan. 3 Û hemû kalepîrên Îsraêlê
hatin û kahînan Sindoqê rakirin.
4 Û Sindoqa XUDAN û çadira
wî ya civandinê û hemû taximên
pîroz ên ku di Çadirê de ne anîn
jorê; kahîn û Lêwiyiyan vana

anîn jorê. 5 Û qiral Silêman û
hemû civaka Îsraêl ya ku li cem
wî civiyane tevî wî li ber Sindoqê
bûn, mîh û gayên dê bi pirraniyê
nayên jimartin û nayên hesibandin
qurban dikirin. 6 Û kahînan
Sindoqa Peymanê ya XUDAN
birin hundir, cîhê wê, odeya
hundirîn ya xanî, birin Cîhê Herî
Pîroz, di bin bazikên kerûbiyan de.
7 Ji ber ku kerûbiyan bazikên xwe
bi ser cîhê Sindoqê ve vekiribûn û
kerûbiyan Sindoqê û rewtên wê ji
jor ve dunuxumandin. 8 Û rewtên
ewqas dirêj bûn ku, serîkên rewtên
ji cîhê pîroz, ê ku li ber odeya navîn
bû dihatin xuyanî kirin; lê belê ji
derve xuyanî nedibûn û heta îroj li
wê derê ne. 9 Di hundirê Sindoqê
de, xeynî her du lewhê kevir; ên ku
gava lawên Îsraêl ji welatê Misirê
ve derketin di çiyayê Horebê de, ê
ku XUDAN ji wan re wad kiribû û
Mûsa xistibû hundirê wê, tiştek tê
de tune bû. 10 Û wusa bû ku, dema
kahîn ji cîhê pîroz ve derketin,
ewr mala XUDAN dagirt 11 û ji
ber ewrê kahînan hêz neanîn ku
bona xizmetê bisekinin; ji ber ku
mezintiya XUDAN mala XUDAN
dagirtibû.

*Gotara ku Silêman ji gel re dibêje*

12 Wê gavê Silêman got: XU-
DAN gotiye ku, ew di reşe tariyê
de rûniştiye. 13 Bona rûniştinê ji
te re xaniyekî, cîhekî ku tu abadîn
wê ji xwe re bi şûnwarî bigire ava
kirim. 14 Û qiral zivirî paşiya xwe
û hemûya civaka Îsraêlê pîroz kir
û hemû civaka Îsraêlê li ser pêlan
sekinî bûn. 15 Û wî got: Bila
Xwedayê Îsraêl XUDAN pîroz
be û ew Xwedayê ku bi devê xwe
ji bavê min Dawid re gotiye: 16 Ji
roja ku netewa xwe Îsraêl ji Mi-
sirê derxistime, bi çêkirina xani-
yekî, ya bona ku navê min li wir
be, ji hemû nîjadên Îsraêlê baja-
rekî nebijartime; lê belê bona ku
li ser netewa min be, Dawid bi-
jartime gotiye û bi destê xwe ani-
ye cîh. 17 Û bona Xwedayê Îsraêl
XUDAN, ava kirana xaniyekî, di
dilê bavê min Dawid de bû. 18 Lê
belê XUDAN ji bavê min Dawid
re got: Madem ku te bona navê
min ava kirina xaniyekî xist dilê
xwe, te qenc kir ku xist dilê xwe;
19 lê belê tuyê xanî ava neke, lê
dê lawê te yê ku ji nîjada te ve
derkeve, wî xaniyî ji navê min re
ava bike! 20 Û XUDAN gotina
ku axifiye aniye cîh; ji ber ku ez
li cîhê bavê xwe Dawid ve sekinî-
me û mîna ku XUDAN wad ki-
riye di texta Îsraêlê de rûniştime
û ji navê XUDAN Xwedayê Îs-
raêl re xanî çêkirime. 21 Û li wir
bona Sindoqê cîh çêkirime, dema
bapîrên me ji welatê Misirê der-
xistine, peymana ku XUDAN bi
wan re çêkiriye, di hundirê wê
Sindoqê de ye.

*Duaya Silêman*
22 Û Silêman li ber pêşkêşîgeha
XUDAN, li hember civaka Îs-
raêlê sekinî û destê xwe berbi
ezmana ve vekir 23 û got: Ya
XUDAN, Xwedayê Îsraêl, ne li
jor, li ezman, ne jî li jêrîn, li erdê
Xwedayek mîna te nîne; tu bi
qûlên xwe ên ku bi hemû dilên
xwe li ber te dimeşin re peyman
û dirûdiyê digire! 24 Te ji qûlê
xwe, bavê min Dawid re bi tiştê
ku te wad kiribû girt; belê, te bi
devê xwe got û mîna ku îroj wusa
ye bi destê xwe anî cîh. 25 Û niha
ya XUDAN, Xwedayê Îsraêl, bi
gotina ku: Mîna ku tu li ber min
meşiya ye, ger lawên te jî bona li
ber min bimeşin, tenê bala xwe
bidin rêya xwe, bona ku li texta
Îsraêlê rûne, dê li ber min zilamek
jî ji te kêm nebe, te ji bavê min,
qûlê xwe Dawid re gotiye bigi-
re[1]! 26 Û niha ya Xwedayê Îsraêl,
ez lava dikim, bila gotina ku te ji
qûlê xwe, bavê min Dawid re go-
tiye, rast derkeve!
27 Gelo bi rastî jî Xwedê li rûyê
erdê dijî? A vay, tu di ezmanan, di
ezmanên ezmanan de jî hil nayê;
ka li ku ma ku, ev xaniyê ku ava
kirime! 28 Lê belê tu, ya XUDAN
Xwedayê min, îroj, bona bihîstina
hawar û duaya ku ev qûlê te li ber
te dike, berê xwe bide dua û la-
vayên vî qûlê xwe; 29 da ku, bona
bihîstina duayê vî qûlê te ên ku
ber bi vir bila çavên te berbi vî xa-
niya; ê ku te gotibû: Dê navê min
li wir be! bi şev û roj vekirî bin.
30 Û dema berbi vir dua bikin,
tu lavayên vî qûlê xwe û netewa
xwe Îsraêlê bibihîze; li ezman, di
şunwarê xwe de bibihîze û dema
tu bibihîze, lê biborîne!
31 Ger zilamek, li dijî cîranê xwe
sûc bike û bona ku sondê bidê,
sondê lê bar bike û were malê û
li ber pêşkêşîgehê sondê bixwe;
32 wê gavê li ezman bibihîze û
bike û bona ku tu rêya yê xerab
bîne serê wî, wî bi xerab kirinê û
bona ku tu li gor bawerî û xêra
wî bide salih, wî bi heq derxistinê
daraziyê bide!
33 Dema netewa te Îsraêl, bona
ku li dijî te sûc kirine li ber ne-
yar hate lêxistin, dîsa vegerin
te û navê te bînin zimên û li vê
malê dua û feryadê ji te re bikin;
34 wê gavê li ezmanan bibihîze û
li sûcê netewa xwe Îsraêlê bibori-
ne û wan dîsa bîne welatê ku te
dabû bavên wan. 35 Ger ji bona
ku li dijî te sûc kirine, ezman bên
girtin û baran neyê barîn û berbi
vî cîhî dua bikin û navê te bînin
zimên û gava tu wan nizm bikî,
ew ji sûcên xwe vegerin; 36 wê
gavê li ezmanan bibihîze û li sûcê
qûlên xwe û li yê netewa xwe
Îsraêlê biborîne ku, bila tu rêya

1 An jî: Bîne cîh.

qenc ya ku dê tê de bimeşin hînî
wan bike û baranê bide warê ku te
bi mêrasî daye netewa xwe.
37 Ger li welat xela çêbibe, weba
bibe, ger bayê sebûnê an jî uf-
nik, kullî an jî maşot bibe; ger di
welatê ku bajarên wî[1] lê ne de,
neyarê wî dor lê bigire; kîjan asîw,
kîjan nexweşî bibe, bila bibe;
38 ji aliyê her zilamekî, ji hemûya
netewa te Îsraêl ve duayek û la-
vayek bibe, her kes bi derdê dilê
xwe ve bizanibe û destên xwe
berbi vî xaniya vekin; 39 wê
gavê ji ezman ve, di şunwara
xwe de bibihîze û bibexşîne û
bike û ji her zilamê ku tu bi dilên
wan dizane re, li gor hemû rêyên
wan bide; – ji ber ku tu, tenê tu
bi dilên hemûyên lawên mirov ve
dizane –; 40 da ku, bila di hemû
rojên di welatê ku te daye bapîrên
me de, ji te bitirsin.
41 Û biyanê ku ne ji netewa te Îs-
raêlê yî, dema di oxra navê te de
ji welatê dûr ve hate, 42 – ji ber
ku dê di derheqê navê te yî mezin
û bazûya te yî hatiye dirêj kirin de
bibihîzin –; dema werin û berbi vê
malê ve dua bikin; 43 di ezmanan
de, di şunwarê xwe de bibihîze û
li gor hemû tiştên ku yê biyan ji
te re diqêre bike, da ku, netewa
te Îsraêl bona ku ji te bitirse, bila
hemû neteweyên dinê bi navê te
bizanibin û bila bizanibin, ev xa-
niyê ku ava kirime bi navê te, tête
bang kirin.
44 Ger netewa te, ji rêyekî tu wan
bişîne li dijî neyarê xwe û berbi
bajarê ku te ji XUDAN re hilbi-
jartiye û berbi mala ku bona navê
te ava kirime dua bikin; 45 wê
gavê dua û lavayên wan ji ezman
ve bibihîze û doza wan bibîne.
46 Ger ew li dijî te sûcê bikin – ji
ber zilamê ku sûcê neke nîne – û
ger tu li dijî wan hêrs bibe û wan
bide destê neyaran û yên ku koça
wan radikin dixwaze bila nêzîk be,
an jî dûr be, wan berbi welatê ne-
yar ve bajo; 47 lê belê li welatê ku
hatine sirgûn kirin bifikirin û dîsa
vegerin û bi gotina: Me sûc kirin,
rêşaşî kirin, me xerabiyê kirin li
welatê ên ku wan sirgûn kirine
lavayan ji te re bikin; 48 li welatê
neyarên ku wan sirgûn kirine bi
hemû dilên xwe û bi hemû canên
xwe ji te re vegerin û berbi welatê
ku te dabû bapîrên wan, berbi ba-
jarê ku te bijartiye û xaniyê ku ji
navê te re ava kirime dua bikin;
49 wê gavê li ezman, di şunwarê
xwe de dua û lavayên wan bibihî-
ze û doza wan bibîne! 50 Û nete-
wa xwe, ya ku li dijî te sûc kiriye û
li hemû gunehên ku li dijî te kirine
biborîne û li ber ên ku koça wan
rakirine rehma xwe li wan bike
ku bila heyfa wan jî li vana bê;
51 ji ber ku ew, netewa te yên ku te

[1] An jî: Bajarên te.

wan ji nava ocaxa hesin, Misirê ve
derxistiye ne û mêrasa te ne; 52 da
ku, dema her ku feryad û hawarê
ji te re bikin, bona ku tu lavaya vî
qûlê xwe û ya netewa xwe Îsraêlê
bibihîzî, bila çavên te vekirî be!
53 Ji ber, dema te bapîrên me
ji Misirê derxist, mîna ku te bi
navdîtiya qûlê xwe Mûsa gotibû,
bona ku bibin mêrasa te, te wan ji
hemû neteweyên din ên dinê cihê
kir ya Xudan, XUDAN!
54 Û wusa bû ku, dema Silê-
man, hemû vê dua û lavaya ku ji
XUDAN re dikir, qedand, ji ber
pêşkêşîgeha XUDAN, bi awayê
ku destê wî berbi ezmanan ve
vekirî rûniştîbû rabû. 55 Û li ser
pêlan sekinî û bi dengekî bilind
hemûya netewa Îsraêlê pîroz kir û
got: 56 XUDANê ku li gor hemû
tiştên ku wad kiriye aramiyê daye
netewa xwe Îsraêlê bila pîroz be!
Ji hemû gotinên wî yên qenc, ên
ku bi navdîtiya qûlê xwe Mûsa
gotibû, tenê yek jî vala derneket.
57 Xwedayê me XUDAN, mîna
ku bi bapîrên me re bû, bila bi me
re jî be; me bernede û neterikîne;
58 da ku, bona em di hemûyên
rêyên wî de bimeşin û emirên ku
ji bapîrên me re emir kiribû û za-
gonên wî û daraziyên wî bigirin,
dilên me berbi xwe biherikîne[1]!
59 Û van gotinên min ên li ber-
gerînê yên ku li ber XUDAN in,
bila bi şev û roj nêzîkî Xwedayê
me XUDAN bibin, da ku, bila
doza vî qûlê xwe û ya netewa xwe
Îsraêlê roj bi rojê bibîne; 60 da ku,
bila hemû netewên dinê bizanibin,
yê ku XUDAN Xwedê ye, ew e;
xeynî wî nîne. 61 Û mîna ku di
îrojê de yî, bona ku di zagonên wî
de bimeşin û bona girtina emirên
wî, bila dilê we di Xwedayê we
XUDAN de yek be!
62 Û qiral û hemûya Îsraêl yên ku
pê re bûn li ber XUDAN qurba-
nan serjê kirin. 63Û Silêman, bi
qurbana mîna pêşkêşiyên xweşiyê
bin, bîst û du hezar ga û sed û bîst
hezar mîh pêşkêş kir. Bi vî awayî
qiral û hemû lawên Îsraêl mala
XUDAN tirxan kirin. 64 Di wê
rojê de qiral, navenda hewşa li
ber mala XUDAN e pîroz kir; ji
ber ku pêşkêşiya şewitandinê û
pêşkêşiya nan û donê pêşkêşiyên
xweşiyê li wir pêşkêş kir, ji ber
pêşkêşîgeha tûnc ya li ber XU-
DAN bû, bona girtina pêşkêşiya
şewitandinê û pêşkêşiya nan û
donê pêşkêşiyên xweşiyê biçûk
hatin. 65 Û di wê wextê de Silê-
man, civakek mezin, ji cîhê ketina
Hamatê heta newala Misirê, tevî
hemûya Îsraêlê, ku li cem wî bûn,
li ber Xwedayê me XUDAN heft
û heft roj, çardeh roj cejnê kirin.
66 Roja heyştan netewê şand û qi-
ral pîroz kirin û ji ber hemû qen-

[1] Dilên me berbi xwe bikişîne, an jî: Meyl bike.

ciya ku ji qûlê XUDAN Dawid û netewa xwe Îsraêlê re kiriye bi kêfxweşî û di nava dilşayiyê de vegeriyan çadirên xwe.

*Xudan dîsa bi Silêman ve xuyanî dibe*
2.Dîr 7,11-22

9 Û wusa bû ku, dema Silêman ava kirina mala XUDAN û mala qiral û hemû tiştên ku Silêman dixwest bike û çêkirina hemû xwestekên xwe qedand, 2 mîna XUDAN li Gîbeonê xwe nîşanî Silêman dabû, cara duwemîn xwe nîşanî wî da. 3 Û XUDAN jê re got: Min dua û lavayên ku te li ber min kir bihîst; vî xaniyê ku te bona ku tu navê min abadîn deyne wir pîroz kir û çavê min û dilê min dê her tim li wir bin. 4 Û tu, bona ku li gor hemû tiştên ku emir dame bikî, mîna bavê te Dawid meşiyayî, ger tu li ber min bi yekîtiya dil û bi rastiyê bimeşî û bi zagon û daraziya min bigirî; 5 wê gavê, mîna ku bi gotina: Dê li ser texta Îsraêlê, ji te mêr kêm nebe wadê ji bavê te Dawid re kiribûm, ez ê li ser Îsraêlê texta qiraletiya te abadîn bizexmînim. 6 Lê belê ger hûn an zarokên we ji pêy min meşê vegerin û emir û zagonên min, ên ku danîme ber we negirin, lê belê herin û ji îlahên wekî din re qûlitiyê bikin û peristinê ji wan re bikin; 7 wê gavê ez ê Îsraêl ji welatê ku dame wan rahêlim û bavêjim û xaniyê ku ji navê xwe re pîroz kirime ji ber xwe bavêjim û dê Îsraêl di nava hemû netewan de bibe methelok û qerfokî[1]! 8 Û çawa ku ev xanî ewqasî bilind e, dê her kesê ji ber wê ve derbas bibe şaş bimînin û dê bifikînin û bibêjin: Ma çima XUDAN ji vî welatî û ji vî xaniyî re wusa kir? 9 Û dê bibêjin: Ji ber ku dev ji Xwedayê xwe XUDANê ku bapîrên wan ji welatê Misirê ve derxistiye berdan û bi îlahên wekî din ve zeliqîn û ji wan re peristinê kirin û ji wan re qûlitiyê kirin; ji ber vê yekê XUDAN hemûya vê xerabiyê bi ser wan ve anî.

*Çalakiyên Silêman yên din*
2.Dîr 8; Wai 2,2-20

10 Û wusa bû ku, Silêman her du xaniyan, xaniyê XUDAN û xaniyê qiral paşî ku di bîst salî de ava kir 11 û qiralê Sûrê Hîram, li gor hemûya xwesteka Silêman darê erzê û darê serwiyê û zêr peyda kiribû, wê gavê qiral Silêman, li warê Galîlê, bîst bajarî dan Hîram. 12 Û Hîram, bona bajarên ku Silêman danê bibîne ji Sûrê derket û ji wan dilxweş nebû[2]. 13 Û wî got: Bira, ev bajarên ku te dayîne min çi ne? Û heta îro

[1] Pêkenokî.

[2] Wan bajaran neecibandin.

ji wan re warê Qebûlê hate gotin.
14 Û Hîram sed û bîst talant[1] zêr
ji qiral re şand.
15 Û sedema ku qiral Silêman
suxrekaran dabûn hev, ava kirina
xaniyê XUDAN û xaniyê xwe û
Mîllo û dîwarê Orşelîmê û Hatsor
û Meggîdo û Gêzer bûn. 16 Qi-
ralê Misirê Fîrawûn derketibû û
Gêzer girtibû û agir pê xistibû[2] û
li Kenaniyên ku li bajêr rûdinin
xistibû û wê bi giranî dabû qîza
xwe, pîreka Silêman. 17 Û Silê-
man Gêzer û Beyt-Horona jêrîn
18 û Baalatê û Tamara li welêt di
çolê de yî 19 û hemû bajarên em-
barê, ên Silêman û bajarên bona
erebeyên cengê û bajarên bona
siwarên xwe û li Orşelîmê û li
Lubnanê û li hemû welatên di bin
rêveberiya xwe de bona zewqa
xwe, tiştên ku Silêman dixwest
ku bike çêkirin. 20 Û dema em
werin hemû netewa ku ji Amori-
yan, ji Hîttiyan, ji Perîzziyan, ji
Hîviyan û ji Yebûsiyan mayine û
ne ji lawên Îsraêlê ne, 21 yên ku li
paşî wan li welat mane û zarokên
wan ên lawên Îsraêl bi tûmî hêz
neanîne ku wan tune bikin, mîna
ku îro jî wusa ye, Silêman qûlên
suxrekar dan hev[3]. 22 Lê belê
Silêman ji lawên Îsraêl qûl nekir;
lê vana serokên zilamên cengê û
xizmetkar û serok û cengvanên
erebeyan û yên erebeyên xwe û
siwarên xwe bûn.
23 Û serokên Silêman ên ku li ser
kar bûn ev bûn; pênc sed û pêncî
kes bûn û çavdêriyê li netewa ku
li kar dixebite dikirin.
24 Lê belê qîza Fîrawûn, ji bajarê
Dawid, derket xaniyê ku Silêman
bona wê çêkiriye; wê gavê Mîllo
ava kir.
25 Û Silêman li ser pêşkêşîgeha ji
XUDAN re ava kiriye, pêşkêşiyên
ku di salê de sê carî tên şewitandin
û pêşkêşiyên xweşiyê pêşkêş di-
kirin; tevî vana li ser pêşkêşîgeha
ku li ber XUDAN e buxurê
dişewitand. Û xanî qedand.
26 Û qiral Silêman li Etsyon-
Gebera ku li welatê Edomê li rexa
Behra Gewez, li cem Elota yî keşti-
yan çêkir. 27 Û Hîram, qûlên xwe,
behrvanên ku bi behrê ve dizanin,
tevî qûlên Silêman di keştiyan de
şand. 28 Û gîhaştin Ofîrê û ji wir
çar sed û bîst talant zêr rahiştin û
wê ji qiral Silêman re anîn.

### *Qiralîçeya Şebayê serîlêdana Silêman dike*

2.Dîr 9,1-29; Lûq 11,31

10 Û qiralîçeya Şebayê, dema
ji ber navê XUDAN, nav û
dengê Silêman bihîst, bona ku bi

---

1 Li rasteka menan binêrin.
2 An jî: Wê şewitandibû.
3 Civandin.

pirsokan wî biceribîne hat. 2 Û bi
ajaweyek zehf mezin, bi gellek
deveyên bi biharat û gellekî zêr û
bi kevirên biqîmet barkirî ve hat
Orşelîmê û hate cem Silêman û
di derheqê hemû tiştên ku di dilê
xwe de ye de bi wî re axifî. 3 Û
Silêman bersiva hemû pirsên wê
da; bona qiral tiştekî veşartî[1] ku
bersivê nedabe pîrekê, tunebû. 4 Û
gava qiralîçeya Şebayê, hemû hîk-
meta Silêman û xaniyê ku çêkiriye
5 û xwarina sifra wî û rûniştina
qûlên wî û sekinîna xizmetkarên
wî û kincên wan û meygerên[2]
wî û pêlika[3] ku pê hildikişe mala
XUDAN dît, êdî pê re can nema.
6 Û ji qiral re got: Gotina ku di
derheqê karên te û hîkmeta te de
li welatê xwe bihîstime a vay, rast
e. 7 Û heta ku hatim û çavên min
wê dîtin, bi wan gotinan bawer
nekiribûm û a vay, nêviyê wê jî
ji min re nehatiye gotin; hîkmeta
te û kêfxweşiya te ji nûçeya ku
gihîştiye guhê min bilindtir in.
8 Zilamên te çiqas kêfxweş, ev
qûlên te çiqas kêfxweş her tim li
ber te disekinin û hîkmeta te di-
bihîzin. 9 Xwedayê te XUDANê
ku bona te deyne ser texta Îsraêlê
ji te razî bûye bila pîroz be! ji ber
ku XUDAN bi abadînî ji Îsraêlê
hez dike, bona ku tu heq û rastiyê
bikî, te li ser Îsraêlê kir qiral. 10 Û
sed û bîst talant zêr û bi gellekî bi-
harat û kevirên biqîmet dan qiral;
li gor zêdeyiya biharata ku qiralîça
Şebayê da qiral, carekî din biharat
nehat.
11 Û keştiyên Hîram ên ku ji
Ofîrê zêr tînin jî, ji Ofîrê gellek
darên ginûyê û kevirên biqîmet
anîn. 12 Û qiral ji darên ginûyê,
bona mala XUDAN û bona mala
qiral sitûnan û bona mûsikvanan
çenkan û santûran çêkir; heta îroj
darên ginû, ên wusa nehatin û ne-
hatin dîtin.
13 Û paşî ku qiral Silêman, li
gor comerdiya qiral Silêman da
qiralîça Şebayê, hemû xwesteka
wê, her tiştê ku dixwaze da wê. Û
qiralîçe tevî qûlên xwe vegeriya û
çû welatê xwe.

*Dewlemendiya Qiral Silêman*

2.Dîr 9,13-29; 5.Mûs 17,17

14 Û wezna zêrê ku di salekî de ji
qiral Silêman re hatiye, 15 xeynî
yên ji zilamên ku danûstendinê
dikin û ji danûstendina bazirgan û
ji qiralên hemû welatên Ereban û
ji waliyên welat ve hatine, şeş sed
û şêst û şeş talant zêr bûn. 16 Û qi-
ral Silêman, ji zêrê kutayî du sed
mertalên mezin çêkir: Ji merta-
lekî mezin re şeş sed şekel zêr çû.

[1] An jî: Di derheqê wan de.
[2] Sakiyên wî.
[3] An jî: Pêşkêşiya şewitandinê ya ku pêşkêş dike.

17 Û ji zêrê kutayî sê sed mer-
talên biçûk çêkir; ji mertalekê re
sê mina[1] zêr çû û qiral vana danîn
mala daristana Lubnanê. 18 Û
qiral ji diranê fîlan textekî mezin
çêkir û dorûbera wê, bi zêra safî
girt. 19 Şeş pêlikên textê hebû û ji
aliyê dawîn ve serê textê girover
bû û li cîhê rûniştinê ji her du ali-
yan ve mil hebûn û li cem milan
du şêr disekinîn. 20 Û li ser her
şeş pêlikan, li her du alî mil hebûn
û du şêr li ber milan disekinîn; li
tu welatî, tiştekî wusa nehatiye
çêkirin. 21 Û feraxên vexwarinê,
ên qiral Silêman hemû ji zêran
û hemû feraxên xaniyê darista-
na Lubnanê ji zêrên xalis bûn; ji
zîvê tunebû; di rojên Silêman de,
zîv bi tiştekî nedihat hesibandin.
22 Ji ber ku tevî keştiyên Hîram,
keştiyên qiralên Tarşîşê di behrê
de bûn; keştiyên Tarşîşê sê salî
carekî zêr û zîv, diranên fîlan û bi
teyrên tawis ve barkirî dihatin.
23 Û qiral Silêman, ji aliyê dew-
lemendiyê û hîkmetê ve ji hemû
qiralên dinê mezintir bû. 24 Û
bona hîkmeta ku Xwedê xistiye
dilê Silêman bibihîzin, hemûya
dinê li wecê wî digeriyan. 25 Û
ji wan her yek ji salê heta salê bi
xelatî, feraxên zîv û feraxên zêr û
kincan û çekan û biharat û hespan
û qantiran dianîn.
26 Û Silêman erebeyên cengê û
siwariyan civand û hezar û çar
sed heb erebeyên wî û donzdeh
hezar siwarên wî hebûn; wan danî
bajarên erebeyan û li cem qiral,
danî Orşelîmê. 27 Û qiral zîvê di
Orşelîmê de daxist merteba ke-
vir û bi pirraniyê darên erzê kir
mîna darên hêjîra bejik, yên ku li
Şefelayê[2] ne. 28 Û hespên Silê-
man ji Misirê ve dihatin anîn û
taximê tacirên qiral, wan bi kerîtî,
bi berdêlekê distendin. 29 Û ere-
beyek cengê bi şeş sed şekel zîvî
û hespek bi sed û pêncî şekelî ji
Misirê ve derdiket û dihat; bona
hemû qiralên Hîttiyê û bona qi-
ralên Sûriyê jî bi vî awayî bi des-
tên wan ve dihatin anîn.

*Silêman ji Xwedê dûr dikeve*

5.Mûs 17,17; 7,3-4; Neh 13,23-27

11 Û qiral Silêman, tevî qîza
Fîrawûn, ji Moabiyan, Am-
moniyan, Edomiyan, Saydayiyan
û ji Hîttiyan ji gellekî pîrekên bi-
yan ve hez kir. 2 Ew ji netewe-
yên ku XUDAN bona wan, go-
tina: Divê hûn nerin nava wan û
ew jî neyên nava we; ji ber ku,
dê muheqeq dilê we li pêy îlahên
xwe çewt bikin! ji lawên Îsraêl re
gotiye bûn; Silêman bi hezkirinê
bi wan ve hate girêdan. 3 Û heft
sed jinên wî qîzên qiralan bûn û

1 Li rasteka menan binêrin.

2 Cîhê çiyayî yê ku li rojhilata deşta qeraxê ye.

sê sed cariyên wî jî hebûn û jinên
wî dilê wî çewt kirin. 4 Û wusa
bû ku, di dema kalepîriya Silê-
man de pîrekên wî, dilê wî li pêy
îlahên din çewt kirin û mîna ku
dilê bavê wî Dawid bi Xwedayê
wî XUDAN re yek bû, dilê wî
ne yek bû. 5 Û Silêman, li pêy
Astartiya îlaheya Saydayiyan û li
pêy tiştê mekrûh yê Ammoniyan
Mîlkom ve çû. 6 Û Silêman, tiştê
ku di çavê XUDAN de xerab e
kir û mîna bavê xwe Dawidê ku
bi tûmî li pêy XUDAN meşiyaye,
nemeşiya. 7 Wê gavê Silêman
li çiyayê ku li ber Orşelîmê ye,
bona Kemoşê ku tiştê Moabî
mekrûh e û bona Molekê ku
mekrûhê Ammoniyan e, cîhekî
bilind çêkir. 8 Û bona hemû jin-
ên biyan ên ku bona îlahên xwe
buxuran vêdixin û qurbanan ser-
jê dikin wusa kir.
9 Û XUDAN li hember Silêman
hêrs bû, ji ber ku dilê wî ji Xwe-
dayê Îsraêl XUDAN ve ê ku du
carî xwe nîşanî wî dayiye û jê re,
10 bi gotina: Li pêy îlahên wekî
din meçe! emir daye, çewt bû û bi
emrê ku XUDAN daye negirt. 11
Û XUDAN ji Silêman re got: Ma-
dem ku ev tişt ji aliyê te çê bû û
te bi peyman û zagonên min, yên
ku min ji te re emir kiriye negirt,
ez ê muheqeq qiraletiyê ji destê te
ve bikişînim û bistînim û ez ê wê
bidim qûlê te. 12 Lê bona xatirê
bavê te Dawid, ez ê vêya di rojên
te de nekim; ez ê wê ji destê lawê
te bikişînim û bistînim. 13 Lê ez
ê hemûya qiraletiyê nekişînim û
nestînim; lê belê bona xatirê qûlê
xwe Dawid û ji ber Orşelîma ku
bijartime ez ê nîjadekî bidim des-
tê lawê te.

*Neyarên Silêman*

14 Û XUDAN li dijî Silêman, Ha-
dadê Edomî bi neyartî rakir; ew
li Edomê, ji nîjada qiral bû. 15 Û
gava Dawid li Edomê bû û Yoabê
serokê artêşê, dema bona yên ku
hatine kuştin derket û li Edomê
li her zilamî xist. 16 Ji ber, heta
ku Yoab her zilamê ku li Edomê
yî şikestand tevî Îsraêlê şeş mehî
li wir ma 17 û wusa bû ku Hadad
û hinek Edomiyên ji nava qûlên
bavê wî ne pê re, bona ku here
Misirê reviyan û Hadad zarokek
biçûk bû. 18 Û ji Midyanê rabûn
û hatin Paranê û tevî xwe ji Paranê
zilaman rahiştin û hatin Misirê,
cem qiralê Misirê Fîrawûn û wî,
xaniyekî da Hadad û jê re emrê
nan da û erd da wî. 19 Û Hadad
di çavê Fîrawûn de zehf xêrê dît
û xwuşka jina xwe, xwuşka qi-
ralîçe Tahpenes, bi jinitî da wî.
20 Û xwuşka Tahpenes, jê re lawê
wî Genûbat anî dinê, Tahpenes li
mala Fîrawûn wî ji şîr ve qut kir û
Genûbat, li mala Fîrawûn, di nav
lawên Fîrawûn de bû. 21 Û Ha-

dad li Misirê bihîst ku; Dawid bi
bapîrên xwe re raketiye û serokê
artêşê Yoab miriye û Hadad ji
Fîrawûn re got: Min bişîne ku ez
herim welatê xwe. 22 Û Fîrawûn
jê re got: Lê ma li cem min çi kê-
masiya te heye ku, a vay, tu dix-
wazî here welatê xwe? Û got: Qet
tiştekî min; lê dîsa jî bihêle ez
biçim[1]!
23 Û Xwedê Rezonê lawê Elya-
da ê ku ji efendiyê xwe Hadad-
ezerê qiralê Tsoba reviya jî li dijî
Silêman mîna neyarekî din rakir.
24 Û gava Dawid li Tsobayiyan
xist zilaman li cem wî civiyan û
bû serokê nijdeyê û çûn Şamê û
li wir rûniştin û li Şamê qiraletiyê
kirin. 25 Û xeynî xerabiya ku Ha-
dad çêkiriye, di hemû rojên Silê-
man de, ev jî ji Îsraêl re bû neyar
û ji Îsraêlê kerihî û li ser Sûriyê
qiraletiyê kir.

*Yeroboam li dijî Silêman serîhildide*

1.Qir 12,1-24; 2.Dîr 9,31

26 Û yek ji qûlên Silêman,
Efrayîmiyek Tseradayî, Yero-
boamê lawê Nebat û navê diya
wî Tserûa bû, pîrekek jinebî bû,
wî jî destê xwe li dijî qiral rakir.
27 Û sedema ku destê xwe li qiral
re rakir ev bû: Silêman Mîllo çê-
kir û neqeba ku li bajarê bavê xwe
Dawid mayî ye girt. 28 Û ev kesê
Yeroboam, mêrxasekî bi metirsî
bû û Silêman dît ku zilamê ciwan
hunermend e û wî danî ser hemû
karên giran ên mala Ûsiv. 29 Û di
wê wextê de wusa bû ku, dema
Yeroboam ji Orşelîmê derket, pey-
xamber Ahiyayê Şîloyî wî di rê de
dît û Ahiya kincekî nû li xwe kiribû
û ew her du di beyarê de tenê bûn.
30 Û Ahiya bi kincê nû yê ku lê ye
girt û wê çirand û kir donzdeh parî.
31 Û ji Yeroboam re got: Deh
parîk ji xwe re rahêle; ji ber ku
Xwedayê Îsraêl XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê qiraletiyê ji
destê Silêman ve bikişînim û bis-
tînim û deh nîjadî ez ê bidim te,
32 lê belê ez ê bona xatirê qûlê
xwe Dawid û ji ber Orşelîma ku
ji hemû nîjadên Îsraêlê ve bijarti-
me, dê nîjadek ya wî be; 33 ji ber
ku min berda û ji Astartî ya îlaha
Saydayiyan re, Kemoşa îlahê
Moab re û Mîlkomê îlahê lawên
Ammon re peristinê kir û bona
wekî bavê wî Dawid tiştê ku di
çavê min de rast e bike û bona
ku bi zagon û daraziyên min ve
bigire, di rêyên min de nemeşiya.
34 Û ez ê hemûya qiraletiyê ji
destê wî ve nestînim; lê belê bona
xatirê qûlê minî bijartî Dawidê ku
bi hemû emir û zagonên min ve
girtiye, ez ê di hemû rojên jiyana
wî de, wî bikim hukimdar, 35 lê
belê ez ê qiraletiyê ji destê lawê wî
bistînim û ez ê wê bidim te, deh nî-

1 An jî: Muheqeq min bişîne!

jadî. 36 Û ez ê nîjadekî wusa bidim
lawê wî ku, li ber min, li Orşelîmê,
bajarê bona ku navê xwe deynim
wir bijartime, bila bona qûlê min
Dawid her tim bibe çira[1]. 37 Û ez
ê te bigirim û tuyê li gor her tiştê
ku canê te dixwaze qiraletiyê bike
û tuyê li ser Îsraêlê bibe qiral.
38 Û dê wusa bibe ku, mîna qûlê
min Dawid kiriye, ger tu bona ku
bi zagon û emirên min ve bigirî,
guhdariyê li her tiştên ku emirên
wan dame te bikî û di rêyên min
de bimeşî û tiştê ku di çavê min de
rast e bikî, ez ê bi te re bim û mîna
ku bona Dawid kirime, ez ê bona
te jî xaniyekî zexim ava bikim û
ez ê Îsraêlê bidim te. 39 Û ji ber vê
yekê ez ê nîjada Dawid kêm bikim,
lê belê ne di hemûya rojan de[2].
40 Û Silêman bona ku Yeroboam
bukuje şuxulî; lê belê Yeroboam
rabû û reviya Misirê, cem Şîşakê
qiralê Misirê û heta mirina Silê-
man, li Misirê ma.
41 Û karên Silêman, yên din û her
tiştê ku kiriye û zanyariya wî, ma
di kitêba Silêman de ne hatine ni-
vîsandin? 42 Û rojên ku Silêman
li Orşelîmê, li ser hemûya Îsraêlê
qiraletiyê kiriye çel sal bûn. 43 Û
Silêman bi bapîrên xwe re raket û
li bajarê bavê xwe Dawid ve hate
binerd kirin û li dêvla wî lawê wî
Rehoboam bû qiral.

*Îsraêlî li dijî Rehoboam serîhildidin*
2.Dîr 10

12 Û Rehoboam çû Şekemê; ji
ber ku hemûya Îsraêl, bona
ku wî bikin qiral, hatibûn Şekemê.
2 Û wusa bû ku, dema Yeroboamê
lawê Nebat bihîst, ji ber ku hîn ew
li Misirê bû, ji ber qiral Silêman
reviyabû wir û Yeroboam li Mi-
sirê rûdinişt 3 û şandin û bangî
wî kirin, Yeroboam û hemû civa-
ka Îsraêl hatin û bi Rehoboam re
axifîn û jê re gotin: 4 Bavê te nîrê
me dijwar kir; ev xizmeta dijwar
ya bavê te û nîrê giran ya daniye
ser me, niha tu sivik bike û em ê ji
te re qûlitiyê bikin. 5 Û ji wan re
got: Niha herin û sê rojê din dîsa
werin cem min. Û netewe çû.
6 Û qiral Rehoboam tevî zilamên
kalepîr, yên ku dema bawê wî hîn
dijiya, li ber wî sekinîbûn şêwirî
û got: Bona ku ez bersivê bidim
vê netewê hûn çi şîretê didin? 7 Û
pê re axifîn û gotin: Ger îro tu ji
vê netewê re bibe qûl û tu qûlitiyê
ji wan re bikî û bersivê bidî wan
û gotinên qenc ji wan re bikî, dê
her tim ji te re bibin qûl. 8 Lê belê
dev ji şîreta zilamên kalepîr ber-
da û bi zilamên ciwan ên ku pê re
mezin bûne û li ber wî disekinin
re şêwirî. 9 Û ji wan re got: Gelo
hûn ê çi şîretî bidin? Û: Ka em çi
bersivê bidin vê netewa ku ji min

1 An jî: Qendîl.
2 Ne heta bi hetayê.

re: Nîrê ku bavê te daniye ser me
sivik bike, dibêjin? 10 Û zilamên
ciwan ên ku pê re mezin bûne, pê
re axifîn û gotin: Tuyê ji wê nete-
wa ku ji te re: Bavê te nîrê me gi-
ran kir, lê belê tu wê ji me re sivik
bike dibêjin re wusa bibêje: Tilîka
min ya biçûk, ji pişta bavê min hîn
jî qalindtir e! 11 Û niha; ger bavê
min nîrekî giran li ser we bar kiri-
be, ez ê nîrê we hîn jî giran bikim;
bavê min bi qamçiyan we perwer-
de kir, lê belê ez ê we bi dûpişkan
ve perwerde bikim; tuyê ji wan re
wusa bibêje.
12 Û mîna ku qiral: Roja sêwemîn
werin cem min gotibû, Yeroboam
û hemûya netewê, roja sêwemîn
hatin cem Rehoboam. 13 Û qiral
bersivekî tund da netewê û şîreta
ku zilamên kalepîr dane wî berda
14 û li gor şîreta zilamên ciwan
bi wan re axifî û got: Bavê min
nîrê we giran kiriye, lê belê ez ê
nîrê we hîn jî giran bikim; bavê
min bi qamçiyan we perwerde ki-
rin, lê belê ez ê we bi dûpişkan ve
perwerde bikim. 15 Û qiral nete-
wê guhdarî nekir; ji ber ku bona
gotina ku XUDAN bi navdîtiya
Ahiyayê Şîloyî ji Yeroboamê
lawê Nebat re gotiye, bête zexim
kirin, ev zivirandin ji aliyê XU-
DAN bû.
16 Û gava hemûya Îsraêl dîtin ku
qiral wan guhdarî nake, netewe
bersivê dan qiral û gotin: Ma di
Dawid de çi para me heye? Û di
lawê Îşay de mêrasa me nîne; ya
Îsraêl, li çadirên xwe! Ya Dawid
niha li mala xwe binêre! Û Îsraêl
çûn çadirên xwe. 17 Lê belê dema
em bên lawên Îsraêl ên ku di ba-
jarên Cihûda de rûdinin, Rehobo-
am li ser wan qiraletiyê kir. 18 Û
qiral Rehoboam, Adoramê li ser
suxrekara yî şand û hemûya Îsraêlê
wî bi keviran recim kirin[1] û mir. Û
qiral Rehoboam bona ku bireve
Orşelîmê, hema li erebeya xwe ya
cengê siwar bû. 19 Û Îsraêl heta
îroj, li dijî mala Dawid asê bûn.
20 Û wusa bû ku dema hemûya Îs-
raêl bihîstin Yeroboam vegeriyaye,
şandin û wî bangî civakê kirin û
hemûya Îsraêlê wî kirin qiral; tenê
xeynî nîjada Cihûda, kesî ku li pêy
mala Dawid ve biçe tune bû.

*Peyxamberiya Şemaya*

21 Û Rehoboam hat Orşelîmê
û hemûya mala Cihûda û nîjada
Benyamîn, sed û heyştê hezar zi-
lamên bijartî, zilamên cengê, bona
ku li dijî mala Îsraêlê cengê bikin
û qiraletiyê ber ve Rehoboamê
lawê Silêman bizivirînin civiyan.
22 Lê belê vê gotina Xwedê, ji
Şemayayê zilamê Xwedê re hat:
23 Bi Rehoboamê lawê Silêmanê
qiralê Cihûdayê re û bi hemûya
mala Cihûda re û Benyamîn re

1 Dan ber keviran.

biaxife û ji wan re bibêje: 24 XU-
DAN wusa dibêje: Hûn ê dernekevin û li dijî birayên xwe lawên Îsraêl cengê mekin; vegerin, bila her kes here mala xwe! Ji ber ku ev tişt ji min bû! Û wan gotina XUDAN guhdarî kirin û li gor gotina XUDAN vegeriyan û bi rêya xwe ve çûn.

*Pûtperestiya Yeroboam û golikên zêrîn ên li Beytelê û Danê ne*

2.Mûs 20,4-6; 32,1-8; 2.Qir 17,21-22;. 2.Dîr 11,13-17

25 Û Yeroboam, li çiyayiya Efrayîmê Şekem ava kir û li wir rûnişt û ji wir derket û Penûêlê ava kir.
26 Û Yeroboam di dilê xwe de got: Dê niha qiraletî vegere mala Dawid;
27 ger ev netewe, bona ku di mala XUDAN de, li Orşelîmê qurbanan serjê bikin derkevin, wê gavê dê dilê netewê ji efendiyên wan re, ji qiralê Cihûda Rehoboam re vegere û dê min bukujin û vegerin Rehoboamê qiralê Cihûdayê.
28 Û qiral şêwirî û du golikên zêrînî çêkir û ji netewê re got: Derketina Orşelîmê bona we zêde ye; ya Îsraêl, a vay, îlahên te, ên ku te ji warê Misirê derxistibû!
29 Û yekê li Beytelê bicîh kir û yê din jî danî Danê.
30 Û ev kar guneh bû û netewe, bona ku li ber yekê peristinê bikin, diçûn ta Danê.
31 Û xaniyên erdê ên bilind ava kir û ji her seriyên netewa ku ne ji lawên Lêwî ne, kahînan çêkir.
32 Û Yeroboam, di meha heyştemîn de, di roja panzdehê mehê de cejnekî mîna cejna ku li Cihûda tête pîroz kirin çêkir û hilkişiya pêşkêşîgehê; bona ku ji golikên ku çêkirine re qurbanan serjê bike, wusa kir û kahînên cîhên bilind ên ku ava kirine li Beytelê sekinand.
33 Û di meha heyştemîn de ya ku ji dilê xwe li hev anîbû, di roja panzdehan de derket pêşkêşîgeha ku li Beytelê ava kiribû û bona lawên Îsraêl cejnekê çêkir û bona ku buxur vêxe derket pêşkêşîgehê.

*Zilamê Xwedê yê Cihûdayî*

13 Û dema Yeroboam bona şewitandina buxurê li cem pêşkêşîgehê sekinîbû, a vay, zilamekî Xwedê, bi gotina XUDAN ji Cihûdayê hate Beytelê.
2 Û bi gotina XUDAN bang da pêşkêşîgehê û got: Pêşkêşîgeh, ya pêşkêşîgeh! XUDAN wusa dibêje: A vay, dê lawek ji mala Dawid re were dinê, dê navê wî Yoşiya be û kahînên cîhên bilind, ên ku di ser te de buxurê vêdixin, dê di ser te de qurban bikin û dê di ser te de hestiyê mirovan bişewitînin!
3 Û di wê rojê de nîşanekê da û wusa got: Nîşana ku XUDAN dibêje ev e: A vay, dê pêşkêşîgeh biqelişe û xweliya ku li ser e, dê birije.
4 Û wusa bû ku, dema qiral gotina

zilamê Xwedê ya ku li Beytelê
gotina ku bang daye pêşkêşîgehê
bihîst, Yeroboam ji ser pêşkêşîgehê
destê xwe dirêj kir û: Pê bigirin!
got. Û destê ku li dijî wî dirêj
kiriye hişk bû û hêz neanî ku wê
berbi xwe bizivirîne. 5 Û li gor
nîşana ku zilamê Xwedê bi gotina
XUDAN daye, pêşkêşîgeh jî qelişî
û xwelî ji pêşkêşîgehê rijiya. 6 Û
qiral bersivê da û ji zilamê Xwedê
re got: Ez rica dikim, ji Xwedayê
xwe XUDAN re lava bike û
bona min dua bike ku bila destê
min vegere halê xwe yî berê. Û
zilamê Xwedê lava ji XUDAN
re kir û destê qiral vegeriya mîna
halê xwe yî berê û bû wekî berê.
7 Û qiral ji zilamê Xwedê re
wusa got: Bi min re were malê û
raweste û ez xelatê bidim te. 8 Û
zilamê Xwedê ji qiral re got: Ger
tu nêviyê mala xwe jî bi min de
ez bi te re naçim û li vî cîhî nan
naxwim û avê venaxwim; 9 ji ber
ku bi gotina XUDAN, bi avahiya:
Tuyê nan nexwe û avê venexwe û
ji rêya ku tu çûye, tuyê venegere!
ji min re hatiye emir kirin. 10 Û ji
rêyekî din ve çû û ji rêya ku hatiye
Beytelê venegeriya.

*Peyxamberê Kalepîr yê Beytelî*

11 Û li Beytelê peyxamberek ka-
lepîr rûdinişt û lawên wî hatin û
her karê ku zilamê Xwedê wê rojê
li Beytelê kiriye jê re gotin û go-
tinê ku ji qiral re gotine jî gîhandin
bavê xwe. 12 Û bavê wan ji wan
re got: Ji kîjan rêyê ve çû? û lawên
wî çûyîna zilamê Xwedê, yê ku ji
Cihûdayê hatiye, ka ji kîjan rêyê
ve çûye dîtibûn. 13 Û ji lawên
xwe re got: Bona min cilê li kerê
bixin! Bona wî cilê li kerê xistin
û li ser wê siwar bû. 14 Û li pêy
zilamê Xwedê ve çû û wî di bin
darçiloyê de rûniştî dît û jê re got:
Zilamê Xwedê ê ku ji Cihûda hati-
ye tu yî? Û wî got: Ez im. 15 Û jê
re got: Bi min re were malê û nan
bixwe. 16 Û got: Ez nikarim bi
te re vegerim û nan bixwim; li vî
cîhî ez bi te re nan naxwim û avê
venaxwim; 17 ji ber ku bi gotina
XUDAN ji min re hate gotin: Tuyê
li wir nan nexwe û avê venexwe û
bona çûyînê, tuyê ji rêya ku tu ha-
tiye venegere. 18 Û jê re got: Ez jî
mîna te peyxamberek im û milya-
ketek bi gotina XUDAN bi min re
axifî û ji min re got: Wî vegerîne,
tevî xwe bîne mala xwe û bila nan
bixwe û avê vexwe. Lê belê jê re
bi derewan got. 19 Û pê re vegeri-
ya û di mala wî de nan xwar û avê
vexwar.

20 Û wusa bû ku, dema ew li sif-
rê rûniştîbûn ji peyxamberê ku wî
şunda vegerandiye re gotina XU-
DAN hat 21 û wî bangî zilamê
Xwedê kir û jê re got: XUDAN
wusa dibêje: Madem ku tu li dijî
gotina XUDAN rabû û bi emrê ku

Xwedayê te XUDAN daye negirt
22 û şunda vegeriya û li cîhê ku ji
te re gotiye: Nan nexwe û avê ve-
nexwe, te nan xwar û avê vexwar;
dê meytê te nekeve gora bapîrên
te! 23 Û wusa bû, paşî ku nan
xwar û avê vexwar, bona wî, bona
peyxamberê ku şunda vegerandi-
ye û aniye, cilikê li kerê şidand.
24 Û ew çû û di rê de şêrekî wî dît
û wî kuşt û meytê wî li erdê raxis-
tî mabû û ker li cem wî disekinî;
şêr jî li cem meyt sekinîbû. 25 Û a
vay, zilaman derbas bûn û meytê
ku li erdê ve hatiye raxistin û şêrê
ku li cem meyt e dîtin û hatin û
li bajarê ku peyxamberê kalepîr
rûdinê gotin.
26 Û peyxamberê ku wî ji rê ve
vegerandiye, dema vê yekê bihîst,
got: Ew zilamê Xwedê ê ku li
dijî gotina XUDAN rabûye yî;
XUDAN jî wî da şêr û şêr jî wî
perçe kir û li gor gotina ku XU-
DAN jê re gotiye wî kuşt. 27 Û bi
lawên xwe re axifî û ji wan re got:
Bona min cilikê li kerê bişidînin!
û cilikê lê şidandin. 28 Û ew çû
û meytê wî ê ku li erdê ve hati-
ye raxistin û kerê ku li cem meyt
sekiniye û şêr dît; şêr meytê wî
nexwaribû û ker jî neperçiqan-
dibû. 29 Û peyxamber meytê zi-
lamê Xwedê rakir û danî ser kerê
û wî şunda anî û bona ku li xwe
bixe û wî binerd bike, hate bajarê
peyxamberê kalepîr. 30 Û meytê
wî xist gora xwe û bi gotina: Wax
birayê min! li xwe xistin. 31 Û
wusa bû, paşî ku wî ew binerd kir
bi lawên xwe re axifî û ji wan re
got: Gava ez bimirim, min li gora
ku zilamê Xwedê hatiye binerd
kirin, binerd bikin; hestiyên min
deynin cem hestiyên wî. 32 Ji ber,
gotina ku li hember pêşkêşîgeha
li Beytelê ye û li hemû xaniyên
cîhên bilind ên li Samîriyê ne, bi
gotina XUDAN re bang kiriye, dê
muheqeq bibe!

*Gunehê Yeroboam yê mezin*

33 Paşî vî karî Yeroboam ji karê
xerab venegeriya, dîsa ji cîhên
bilind re, ji her seriyê netewê ve
kahînan çêkir, her yê ku dixwaze,
bona ku bibe kahînê cîhên bilind,
tirxan kir. 34 Û bona mala Yero-
boam ji rûyê erdê ve bê rakirin û
avêtin û bête helaq kirin ev kar ji
wî re bû gunehek.

*Mirina Lawê Yeroboam*

14 Wê gavê Abiyayê lawê Ye-
roboam nexweş ket. 2 Û
Yeroboam ji pîreka xwe re got: De
rabe û qilafetê xwe biguhere û bila
nizanibin ku tu jina Yeroboam e û
here Şîloyê; a vay, peyxamber Ahi-
ya li wir e û yê ku di derheqê min
û qiralbûna minî ser netewê de go-
tiye ew e. 3 Û deh nan û çorekan û
hebanek hungiv bigire destê xwe û
here cem wî; dê ew ji te re bibêje ku

ka wê çi ji lawik re bibe. 4 Û pîre-
ka Yeroboam wusa kir û rabû û çû
Şîloyê û hat mala Ahiya. Û Ahiya
nedidît, ji ber ku kal bûbû, çavên wî
qerimîbûn. 5 Û XUDAN ji Ahiya re
got: A vay, jina Yeroboam bona ku
di derheqê lawê xwe de ji te bipirse
tê; ji ber ku ew nexweş e; tuyê jê
re wusa bibêje û dê wusa bibe ku;
dema bikeve hundir dê xwe mîna
pîrekek din bide nîşan kirin.
6 Û wusa bû ku dema pîrek ji
derî ve derbas bû, gava Ahiya
dengê lingên wê bihîst, got: Jina
Yeroboam were hundir! Ma çima
tu xwe mîna yekî din dide nîşan
kirin? Û ez bi agahiya giran ji te
re hatim şandin. 7 Here, ji Yero-
boam re bibêje: Xwedayê Îsraêl
XUDAN wusa dibêje: Madem
ku, min te di nava netewê de
bilind kir û te li ser netewa xwe
Îsraêlê ve serwer kir 8 û qiraleti-
yê ji mala Dawid ve kişandime û
stendime û çawa ku wê dame te,
tu nebû mîna qûlê min Dawid, ê
ku bi emrê min ve girtine û tenê
bona ku ya di çavê min de rast
e bikî bi hemûya dilê xwe li pêy
min meşiyayî ye 9 û te ji hemûyên
ku berî te ne zêdetir xerabiyê kir
û bona ku min hêrs bikî tu çû û
ji xwe re îlahên wekî din û pûtên
qewartî çêkir û te min avêt paş
xwe; 10 bo vê yekê ez ê asîwê
bi ser mala Yeroboam ve bînim
û li Îsraêlê dixwaze bila azad be
û dixwaze jî bila qûl be, ez ê her
mêrên ku ji Yeroboam in jê bikim
û bavêjim û ez ê mala Yeroboam,
mîna ku sergînê dimalin heta ku
hemû biçikin bitûmî bimalim.
11 Dê ji Yeroboam, ê ku li bajêr
ve bimire kûçik bixwin û yê ku
li beyarê bimire jî civîkê ezmên
bixwin! ji ber ku XUDAN got.
12 Û tu rabe û here mala xwe;
dema tu pêla xwe bavêje bajêr,
dê lawik bimire. 13 Û dê hemûya
Îsraêl, bona wî li xwe bixin û wî
binerd bikin; ji ber ku, ji Yerobo-
am, yê ku bikeve gorê tenê ew e,
ji ber ku li dijî Xwedayê Îsraêl
XUDAN, di mala Yeroboam de
di wî de tiştekî qenc heye. 14 Û
dê XUDAN, bona xwe qiralekî
deyne ser Îsraêl, dê ew jî wê rojê
mala Yeroboam jê bike û bavêje;
dibêjim çi? Hema niha! 15 Û
dê XUDAN, mîna qamirê ku di
nava avê de diheje, li Îsraêlê bixe
û dê Îsraêlê ji vî erdê qenc ê ku
daye bapîrên wan rake û wan li
aliyê dinî çemê Feratê belav bike,
ji ber ku bi çêkirina Aşerên xwe
XUDAN hêrs kirin. 16 Û ji ber
sûcên ku Yeroboam kiriye û bi
Îsraêlê ve dane kirin dê XUDAN
dev ji Îsraêlê berde.
17 Û jina Yeroboam rabû çû û hate
Tîrtsayê û dema gîhaşt şêmûga
xanî lawik mir. 18 Û li gor gotina
XUDAN, ya ku bi navdîtiya qûlê
xwe peyxamber Ahiya gotiye,

hemûya Îsraêl wî binerd kirin û bona wî li xwe xistin.

*Mirina Yeroboam*

19 Û karên Yeroboam ên ku li pêy mayîne, ka çawa cengê kiriye û çawa qiraletiyê kiriye; a vay, vana di pirtûka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê de nivîsandîne. 20 Û rojên ku Yeroboam qiraletiyê kiriye, bîst û du sal bûn û tevî bapîrên xwe raket û li dêvila wî lawê wî Nadab bû qiral.

*Qiraletiya Rehoboam*

21 Û Rehoboamê lawê Silêman, li Cihûdayê qiraletiyê kir. Dema Rehoboam bû qiral, çel salî bû û li bajarê ku, XUDAN bona navê xwe têxê, ji nav hemû nîjadên Îsraêl ve bijartiye, li Orşelîmê, hevdeh salî qiraletiyê kir û navê diya wî Naamaya Ammonî bû. 22 Û Cihûda, yê ku di çavên XUDAN de xerab e kir û bi sûcên ku kirine, ji her tiştên bapîrên wî çêkirine zêdetir çavnebariyê lê kirin. 23 Û ew jî li ser her girên bilind û di bin her darê hêşîn de bona xwe cîhên bilind û kevirên çikandî û Aşêran çêkir 24 û li welêt, zilamên ku bona fuhşê hatine agahdar kirin jî hebûn; li gor hemû tiştên mekrûh ên neteweyên ku XUDAN wan ji ber lawên Îsraêl qewirandiye kir. 25 Û wusa bû ku, di pênc saliya qiral Rehoboam de, Şîşekê qiralê Misirê li dijî Orşelîmê derket 26 û xezîneyên mala XUDAN û xezîneyên mala qiral rahişt û her tiştî rahişt û hemû mertalên zêrîn ên ku Silêman çêkiribûn rahişt. 27 Û qiral Rehoboam li dêvila wan, mertalên tûnc çêkir û emanetî serokên leşkerên parêzger ên ku li benda deriyê xaniyê qiral in kir. 28 Û wusa bû, her ku qiral diket mala XUDAN, parêzgeran wan dikişandin û dîsa wan şunda dianîn odeya parêzgeran.

29 Û karên Rehoboam ên li paşê mayîne û her tiştên ku kiriye, ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên Cihûda de ne nivîsandîne? 30 Û di navbera Rehoboam û Yeroboam de, di hemû rojan de ceng hebû. 31 Û Rehoboam tevî bapîrên xwe raket û li bajarê Dawid li cem bapîrên xwe hate binerd kirin û navê dayika wî Naamaya Ammonî bû. Û li dêvila wî lawê wî Abiyam bû qiral.

*Qiraletiya Abiyam*

2.Dîr 13

15 Û di hîjdeh saliya qiraletiya Yeroboamê lawê Nebat de, Abiyam li ser Cihûda bû qiral. 2 Li Orşelîmê sê sal qiraletiyê kir û navê dayika wî Maakaya qîza Abîşalom bû. 3 Û di hemû sûcên ku bavê wî, berî wî kirine de meşiya û mîna ku dilê bapîrê wî Dawid tevî Xwedayê wî XUDAN

yek bû, dilê wî ne yek bû. 4 Lê
belê Xwedayê wî XUDAN, bona
xatirê Dawid, bona ku li pêy wî,
lawê wî deyne cîh û bi zexim kiri-
na Orşelîmê, li Orşelîmê çerayekê
da wî; 5 ji ber ku Dawid tiştê ku
di çavê XUDAN de qenc e kir û
di hemû rojên jiyana xwe de xey-
nî karê Hîttî Ûriya, ji tu tiştê ku
wî emir kiriye çewt nebû. 6 Û di
hemû rojên jiyana wan de di nav-
bera Rehoboam û Yeroboam de
ceng hebû.
7 Û karên Abiyam ên li paşê
mayîne û her tiştên ku kirine,
ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Cihûda de ne nivîsandîne? Û di
navbera Abiyam û Yeroboam
de ceng hebû. 8 Û Abiyam tevî
bapîrên xwe raket û wî di bajarê
Dawid de binerd kirin û li dêvila
wî lawê wî Asa bû qiral.

*Qiraletiya Asa*

2.Dîr 14-16

9 Û di bîst û yek saliya qiralê
Îsraêlê Yeroboam de, Asa li ser
Cihûda bû qiral. 10 Li Orşelîmê
çel û yek sal qiraletiyê kir û
navê dayika wî Maaka ya qîza
Abîşalom bû. 11 Û Asa mîna
bapîrê xwe Dawid, tiştê ku di
çavê XUDAN de rast e kir.
12 Û zilamên ku bona fuhşê ha-
tine agahdar kirin ji welêt qewi-
randin û hemû pûtên ku bavên
wî çêkirine rakir. 13 Dayika xwe
Maaka jî ji qiralîçetiyê rakir, ji
ber ku bona Aşera pûtekî mekrûh
çêkiribû û Asa pûtê wê jê kir û
li newala Kîdronê de şewitand.
14 Lê belê cîhên bilind ji holê ve
nehatin rakirin; lê belê dilê Asa
her tim bi XUDAN re yek bû.
15 Û tiştên ku bavê wî pîroz kiri-
ne û tiştên ku wî bi xwe pîroz ki-
rine, feraxên zîv û zêr anîn mala
XUDAN.
16 Û di navbera Asa û qiralê Îsraêlê
Baaşa de, di hemûyên rojên wan
de ceng hebû. 17 Û Baaşayê qiralê
Îsraêlê, li dijî Cihûda rabû û bona
ku nehêlê tu zilam here cem Asa
û ji cem wî derkeve, Ramayê ava
kir. 18 Û Asa, hemû zêr û zîvên
ku di xezîneya mala XUDAN de
mayîne û xezîneyên mala qiral
girt û wan dan destên qûlên xwe û
qiral Asa wan ji Ben-Hadadê qiralê
Sûriyê, ê ku li Şamê rûdine, lawê
Tabrîmmonê lawê Hezyon re şand
û got: 19 Di navbera min û te de,
di navbera bavê min û bavê te de
peyman heye; a vay, bi xelatî zêr û
zîv ji te re şandim; here û peymana
xwe ya bi qiralê Îsraêlê Baaşa re
xera bike ku, bila ji ser min ve here!
20 Û Ben-Hadad qiral Asa guhdarî
kir û serokên artêşên xwe li dijî
bajarên Îsraêlê şand û li Iyon û
li Danê û li Abel-Beyt-Maakayê
û tevî hemûya warê Naftaliyê li
hemûya Kînnerotê xist. 21 Û wusa
bû ku dema Baaşa vê yekê bihîst

dev ji ava kirina Ramayê berda û
li Tîrtsayê rûnişt[1]. 22 Û qiral Asa
bangî hemûya Cihûda kir; kesî
ku serbest hatiye berdan tunebû û
kevir û oniyên Ramayê kişandin;
bi vana Baaşa ava dikir û bi wan,
qiral Asa Gebaya Benyamîn û
Mîtspayê çêkirin.
23 Û hemû karên Asa ên li paşê
mayîne û hemûya hêza wî û her
tiştên ku kiriye û bajarên ku ava
kiriye ma di pirtûka Dîrokan ya qi-
ralên Cihûda de ne nivîsandîne? Lê
di dema kalepîriya xwe de ji lingên
xwe ve nexweş ket. 24 Û Asa tevî
bapîrên xwe raket û di bajarê bapîrê
xwe Dawid de, li cem bapîrên xwe
hate binerd kirin û li dêvila wî lawê
wî Yehoşafat bû qiral.

*Qiraletiya Nadab*

25 Û di sala duwemîn ya qirale-
tiya Asayê qiralê Cihûda de Na-
dabê lawê Yeroboam li ser Îsraêlê
bû qiral û li ser Îsraêlê du sal qi-
raletiyê kir. 26 Û yê ku di çavê
XUDAN de xerab e kir û di rêya
bavê xwe de û di sûcê ku wî bi
Îsraêlê re dayiye kirin de meşiya.
27 Û ji mala Îssakar, Baaşayê
lawê Ahiya li dijî wî pergalê danî
û Baaşa, li Gîbbetonê ya ku ya Fi-
listiyan bû, li wî xist; ji ber ku Na-
dab û hemûya Îsraêlê dor û berên
Gîbbetonê digirtin. 28 Baaşa,
di sala sêwemîn ya qiral Asa de
Nadab kuşt û li cihê wî bû qiral.
29 Û wusa bû ku, dema bû qiral,
hema li hemûya mala Yeroboam
xist; li gor gotina XUDAN, ya ku
bi navdîtiya qûlê xwe Ahiyayê
Şîloyî gotibû, ji Yeroboamê yê ku
hilmê digire, kesî ku helaq neki-
riye nehişt; 30 ev jî ji ber sûcên
ku Yeroboam bi kirina wan û bi
Îsraêlê ve dayîna kirina wan XU-
DAN hêrs kiribû çêbû.
31 Û karên Nadab ên li paşê mayî-
ne û her tiştên ku kiriye, ma di
pirtûka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê
de ne nivîsandîne? 32 Û di navbe-
ra Asa û qiralê Îsraêlê Baaşa de di
tûmiya rojên wan de ceng hebû.

*Qiraletiya Baaşa*

33 Di sala sêwem ya qiralê Cihû-
da Asa de, Baaşayê lawê Ahiya li
Tîrtsayê li ser hemûya Îsraêlê bû
qiral. 34 Û ya ku di çavê XUDAN
de xerab e, kir û di rêya Yeroboam
û di sûcê wî de, yê ku bi Îsraêlê ve
dayiye kirin de meşiya.

16 Û li dijî Baaşa, ev gotina
XUDAN ji Yehûyê lawê
Hananîn re hat: 2 Çawa ku te ji
axê ve bilind kirime û te li ser ne-
tewa xwe Îsraêlê kirime serwer,
lê madem ku tu di rêya Yeroboam
de meşiya û bona ku bi sûcê ne-
tewa min Îsraêlê min hêrs bikî, te
bi wan re sûc da kirin, 3 a vay, ez

[1] Bi cîh bû.

ê Baaşa û mala wî bimalim û ba-
vêjim û mala te, ez ê bikim mîna
mala Yeroboamê lawê Nebat. 4 Dê
kûçik yên ji Baaşa, di bajêr de mi-
rine bixwin û dê civîkên ezmên ên
ji wî di beyarê de mirine bixwin.
5 Û karên Baaşa ên li paşê mayîne
û her tiştên ku kiriye, ma di pirtû-
ka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê de
ne nivîsandîne? 6 Û Baaşa tevî
bapîrên xwe raket û li Tîrtsayê
hate binerd kirin û li dêvila wî
lawê wî Ela bû qiral. 7 Û Baaşa ji
ber her xerabiya ku di çavên XU-
DAN de kiriye û bona ku bi karê
destên xwe XUDAN hêrs bike,
mîna ku wekî mala Yeroboam e
û ji ber ku lê xistiye, li dijî wî û
li dijî mala wî jî gotina XUDAN
bi navdîtiya peyxamber Yehûyê
lawê Hanan ve hat.

*Qiraletiya Ela*

8 Di sala bîst û şeşan ya qiralê
Cihûda Asa de, Elayê lawê Baaşa
li Tîrtsayê li ser Îsraêlê bû qiral
û du sal qiraletiyê kir. 9 Û qûlê
wî Zîmrî yê ku li ser nêviyê ere-
beyên cengê ve serok e, li dijî wî
pergalê danî. Û ew li Tîrtsayê bû
û li Tîrtsayê di mala keyayê ma-
liyên xwe Artsan de vedixwar
û serxweş dibû 10 û Zîmrî kete
hundir û di sala bîst û heftan yê
qiralê Cihûda Asa de li wî xist
û wî kuşt û li dêvila wî bû qiral.
11 Û wusa bû ku, dema bû qiral û
li ser texta xwe rûnişt li hemûya
mala Baaşa xist û ji wî, ji merivên
wî û ji hevalên wî tenê zilamekî
jî nehişt. 12 Û bona ku XUDAN
Xwedayê Îsraêl bi pûtên xwe ve
hêrs bikin, ji ber sûcên ku Baaşa û
lawê wî Ela kirine û bi Îsraêlê ve
dayine kirin, 13 li gor gotina ku
XUDAN bi navdîtiya peyxamber
Yehû, li dijî Baaşa gotiye, Zîmrî
hemûya mala Baaşa helaq kir.
14 Û karên Ela yên li paşê mayîne
û her tiştên ku kiriye, ma di pirtû-
ka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê de
ne nivîsandîne?

*Qiraletiya Zîmrî*

15 Di sala bîst û heftan yê qiralê
Cihûda Asa de Zîmrî li Tîrtsayê
heft rojî qiraletiyê kir. Û netewe,
li hember Gîbbetona ku ya Filis-
tiyan e artêşgehê danîbûn. 16 Û
netewa ku li artêşgehê ne, bi go-
tina: Zîmrî bona kuştina qiral per-
galê daniye û lê xistiye bihîstin
û hemûya Îsraêlê, serokê artêşê
Omrî, wê rojê di artêşgehê de li
ser Îsraêlê kirin qiral. 17 Û Omrî
tevî hemûya Îsraêlê ji Gîbbetonê
derket û dor û bera Tîrtsayê girtin.
18 Û wusa bû ku, dema Zîmrî dît
bajêr hatiye girtin ket keleha xa-
niyê qiral û bi ser xwe ve agir bi
mala qiral ve xist 19 û ji ber sûcên
ku kiriye, ji ber ku yê di çavê XU-
DAN de xerab e kiriye û di rêya
Yeroboam de meşiyaye û ji ber ku

bi sûc dayîn kirina Îsraêlê sûc ki-
riye mir. 20 Û karên Zîmrî yên li
paşê mayîne û her tiştên ku kiriye
û xayîntiya ku kiriye, ma di pirtû-
ka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê de
ne nivîsandîne?

*Qiraletiya Omrî*

21 Wê gavê netewa Îsraêlê bû du
parî, nêviyê netewê bona ku Tîbni-
yê lawê Gînat bikin qiral, li pêy wî
çûn û nêvî jî li pêy Omrî çûn. 22 Û
netewa ku li pêy Omrî çûyîne, bi
ser netewa ku li pêy Tîbniyê lawê
Gînat çûyîne ve ketin û Tîbnî mir
û Omrî bû qiral. 23 Di sala sîh û
yekan ya qiralê Cihûda Asa de Omrî
li ser Îsraêlê bû qiral, donzdeh sal
qiraletiyê kir; li Tîrtsayê şeş sal qi-
raletiyê kir. 24 Û çiyayê Samîriyê,
bi du talant zîvî ji Şemer ve stend û
navê bajarê ku li ser çiya çêkiriye
û ava kiriye, li gor navê xwediyê
çiyê Şemer; Samîriye danî. 25 Û
Omrî, tiştê ku di çavê XUDAN
de xerab e kir û ji hemûyên ku
berî xwe ne zêdetir xerabiyê kir.
26 Û di hemû rêya Yeroboamê
lawê Nebat de û di sûcên wî, ên
bona ku Xwedayê Îsraêl XUDAN
bi pûtan ve hêrs bike, sûcên ku bi
Îsraêlê ve dida dayîn de meşiya.
27 Û karên Omrî yên li paşê mayî-
ne û hêza wî ya dida xuyanî kirin,
ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Îsraêlê de ne nivîsandîne? 28 Û
Omrî tevî bapîrên xwe raket û li
Samîriyê hate binerd kirin; li dêvi-
la wî lawê wî Ahab bû qiral.

*Qiraletiya Ahab*

29 Di sala sîh û heyştan ya qiralê
Cihûda Asa de Ahabê lawê Omrî
li ser Îsraêlê bû qiral û Ahabê lawê
Omrî, li ser Îsraêlê bîst û du sal
qiraletiyê kir. 30 Û Ahabê lawê
Omrî, ji hemûyên berî xwe zêdetir
yê ku di çavê XUDAN de xerab e
kir. 31 Û wusa bû ku, wekî ku di
sûcên Yeroboamê lawê Nebat de
meşîn ne tiştek be, Îzebela qîza
qiralê Saydayiyan Etbaal jî bi jini-
tî girt û çû û ji Baal re qûlitiyê kir
û jê re peristinê kir. 32 Û di xani-
yê Baal yê ku li Samîriyê çêkiribû
de, bona Baal pêşkêşîgehê danî.
33 Û Ahab Aşera çêkir û Ahab,
bona ku Xwedayê Îsraêl XUDAN
hêrs bike, ji hemû qiralên Îsraêlê
ên ku berî xwe ne zêdetir kir.
34 Di rojên wî de Hîelê Beytelê,
bajarê Erîhayê ava kir; li gor
gotina XUDAN ya bi navdîtiya
Yêşûyê lawê Nûn ve gotiye, bi bi-
haya[1] lawê xwe yî yekem Abîram
bingeha wê danî û bi bihaya lawê
xwe yî biçûk Segûb jî deriyan xist
cîhên wan[2].

---

1 An jî: Berdêl.

2 An jî: Pê ve kirin

*Peyxamber Êlyas li newala Kerkîtê*

17 Û ji xerîbên ku li Gîleadê
ne Êlyasê Tîşbeyî ji Ahab re
got: Bona mafê Xwedayê Îsraêl,
XUDANê ku zindî ye, yê ku ez li ber
sekinîme, heta ku gotina min nebe,
dê di van salan de xunav û baran
nekeve! 2 Û vê gotina XUDAN
jê re hat: 3 Ji vir here û berî bide
rojhilatê û di newala Kerkîtê ya
ku li hembera Urdunê de ye xwe
veşêre. 4 Û dê wusa bibe ku tuyê
ji newalê ve avê vexwe û bona ku
li wir te xwedî bikin, emir dam
qîjakan. 5 Û ew çû û li gor gotina
XUDAN kir û çû û li cem newala
Kerkîtê ya ku li hember Urdunê ye
rûnişt. 6 Û qîjakan sibehê nan û
goşt jê re dianîn û êvarê nan û goşt
dianîn û ji newalê avê vedixwar.
7 Û di dawiya rojan de wusa bû ku
newal ziwa bû, ji ber ku li welêt
baran tunebû.

*Peyxamber Êlyas û jinebiya Sarefatî*

8 Û vê gotina XUDAN jê re
hat: 9 Rabe, here bajarê Sayda,
Sarefatê û li wir rûnê, bona ku
te xwedî bike, li wir emir dam
jinebiyekê. 10 Û rabû û çû Sare-
fatê û gava gîhaşt deriyê bajêr, a
vay, jinebiyek li wir êzing dida
hev û bangî jinikê kir û got: Ez
rica dikim bona min di feraxê de
hinekî avê rahêje ku ez vexim! 11
Û gava pîrek çû ku rahêje bangî
wê kir û got: Ez rica dikim bona
min pariyekî nan bigire destê xwe!
12 Û wê got: Bona mafê Xwedayê
te, XUDANê ku zindî ye, pîdeyê
min nîne, lê di kûz de lepek arvan
û di hebanê de hinek rûn heye û a
vay, ez du parî êzing didim hev û
ez ê bikevim hundir û bona xwe û
ji bo lawê xwe ez ê wê çê bikim û
em ê bixwin û dawiyê em ê bimi-
rin. 13 Û Êlyas jê re got: Metirse,
here û mîna ku tu dibêjî bike; lê
pêşiyê bona min, ji wê pîdeyekî
biçûk çêbike û ji min re bîne, paşê
tuyê bona xwe û lawê xwe çêbike.
14 Ji ber ku Xwedayê Îsraêl XU-
DAN wusa dibêje: Heta roja ku
XUDAN baranê bide ser erdê dê
di kûz de arvan neqede û di hebanê
de rûn kêm nebe. 15 Û pîrek çû û
li gor gotina Êlyas çêkir û Êlyas
û pîrek û maliyên wê pirr rojan
xwarinê xwarin. 16 Li gor gotina
XUDAN ya bi navdîtiya Êlyas ve
got, di kûz de arvan neqediya û di
hebanê de rûn kêm nebû.
17 Û paşî van tiştan wusa bû ku,
lawê pîreka xwediyê malê nexweş
ket û nexweşiya wî zehf giran bû,
wusa ku di wî de hilm nema. 18 Û
pîrek ji Êlyas re got: Ma çiyî te ji
min ya zilamê Xwedê? Tu bona ku
gunehê min di bîra min de bîne û
lawê min bikuje hatiye cem min!
19 Û wî jê re got: Lawê xwe bide
min! Û wî ji himbêza pîrekê rahişt
û bir odeya jorîn ya ku ew tê de
rûdinê û wî li ser livînê xwe dirêj

kir. 20 Û bangî XUDAN kir û got:
Ya Xwedayê min XUDAN, ma te
bi kuştina lawê pîreka bî, ya ku ez
li cem wê mêvan im, te asîwê anî
serê wê jî? 21 Û sê carî li ser lawik
dirêj bû û bangî XUDAN kir û got:
Ya XUDAN Xwedayê min, ez lava
ji te re dikim, bila canê vî lawikî
vegere hundirê wî! 22 Û XUDAN
dengê Êlyas bihîst û canê lawik ve-
geriya hundirê wî û lawik vejiya.
23 Û Êlyas lawik rahişt û wî ji oda
jorîn ve daxist jêr, anî xênî û wî
da dayika wî û Êlyas got: Binêre,
lawê te dijî! 24 Û jinik ji Êlyas re
got: Niha fêhm kirim ku, tu zila-
mekî Xwedê yî û gotina XUDAN,
ya ku di devê te de heq e[1]!

*Êlyas û Obadya*

18 Û paşî gellek rojan wusa
bû ku, di sala sêwemîn de
vê gotina XUDAN ji Êlyas re
hat: Here û xwe nîşanî Ahab bide
û ez ê baranê bidim ser axê. 2 Û
Êlyas, bona ku xwe nîşanî Ahab
bide çû. Û li Samîriyê xela dijwar
bû. 3 Û Ahab, bangî Obadyayê ku
li ser mala xwe ye kir. Û Obadya
zehf ji XUDAN ditirsiya 4 û wusa
bû ku, dema Îzebel peyxamberên
XUDAN kuşt, Obadya sed pey-
xamberî girt û wan pêncî heb û
pêncî heb di şikeftê de veşart û bi
nan û av wan xwedî kir. 5 Û Ahab
ji Obadya re got: Here hemû bin-
gehên avê û hemû newalan, ên li
welêt; dibe ku em gîha bibînin û
hesp û qantiran bijînin ku ji hey-
wanan helaq nekin. 6 Û bona ku
bigerin, heywanan di nava xwe de
par kirin; Ahab di rêyekê de tena
serê xwe çû û Obadya di rêyekî
din de tena serê xwe çû.
7 Û Obadya di rê de bû û a vay,
Êlyas hate pêrgîniya wî û wî nas
kir û bi ser rû ve ket û got: Efen-
diyê min Êlyas tu yî? 8 Û wî jê re
got: Ez im; here, ji efendiyê xwe
re: A vay, Êlyas li vê derê ye! bi-
bêje. 9 Û wî got: Ma min çi sûc
kir ku tu vî qûlê xwe bona ku bi-
kuje, dide destê Ahab? 10 Bona
mafê Xwedayê te, XUDANê ku
zindî ye, qet welatek û neteweyek
nema ku efendiyê min bona lê-
gerîna te zilam neşandiye û gava
digotin: Nîne! bi wî welat û wî
netewê re, di derheqê ku te nedîti-
ne de sond dida xwarin. 11 Û niha
tu dibêjî: Here, ji efendiyê xwe re:
A vay, Êlyas li vê derê ye! bibêje.
12 Û dê wusa bibe ku dema ez ji
cem te herim, Ruhê XUDAN dê
te bibe cîhekî ku ez pê nizanim û
gava werim û bigihînim Ahab, ew
jî te nebînî, dê min bikuje; lê belê
ev qûlê te ji çûkaniya xwe de ji
XUDAN ditirse. 13 Dema Îzebel
peyxamberên XUDAN dikuşt,
tiştê ku dikirim, ji peyxamberên
XUDAN sed kesî pêncî û pêncî

[1] An jî: Rast e.

ka çawa di şikeftê de veşartime û ka çawa wan bi nan û avê xwedî kirime, qey ji efendiyê min re nehatiye gîhandin? 14 Û niha tu dibêjî: Here, ji efendiyê xwe re: A vay, Êlyas li vê derê ye! bibêje û ew ê min bukuje. 15 Û Êlyas got: Bona mafê XUDANê artêşan yê ku zindî ye, ê ku ez li ber sekinîme, muheqeq ez ê îro xwe nîşanî wî bidim!

*Êlyas li Çiyayê Karmelê*

16 Û Obadya, bona ku pêşwaziyê ji Ahab re bike çû û agahiyê da wî û Ahab bona ku pêşwaziyê ji Êlyas re bike çû. 17 Û wusa bû ku, dema Ahab Êlyas dît, Ahab jê re got: Ya zilamê ku Îsraêlê xistiye tengasiyê, ma tu yî? 18 Lê belê wî got: Yê ku Îsraêlê xistiye tengasiyê, ne ez im; lê tu û mala bavê te ne, ji ber ku we dev ji emirên XUDAN berdan û tu li pêy Baalan çû! 19 Û niha bişîne û hemûya Îsraêlê û çar sed û pêncî peyxamberên Baal ên ku li sifra Îzebel xwarinê dixwin û çar sed peyxamberên Aşera, li çiyayê Karmelê, li cem min bicivînin.

20 Û Ahab ji hemûyên lawên Îsraêl re şand û peyxamberan li çiyayê Karmelê civandin. 21 Û Êlyas nêzîkî hemûya netewê bû û got: Hûn ê heta çi wextî bi her du alî ve bukulin? Ger XUDAN Xwedê be, li pêy wî bimeşin; na ger Baal be, li pêy wî bimeşin! Û netewe qet tu bersivê nedan wî. 22 Û Êlyas ji netewê re got: Bi peyxamber bûna XUDAN ez, tenê ez mam; lê belê peyxamberên Baal çar sed û pêncî kes in. 23 Û bila du ganêr ji me re bête dayîn û gayekî ji xwe re rahêlin û bila wî parî parî cuda bikin û deynin ser êzingan û bila agir pênexin û ez ê gayê din amade bikim û deynim ser êzingan û agir pênexim. 24 Û hûn bangî navê îlahê xwe bikin û ez ê jî bangî navê XUDAN bikim û ger kîjan Xwedê bi agir ve bérsivê bide, Xwedê ew e! Û hemûya netewê bersivê dan û gotin: Ev gotin qenc e!

25 Û Êlyas ji peyxamberên Baal re got: Gayekî bona xwe hilbijêrin û pêşiyê hûn wî amade bikin; ji ber ku hûn bi zêdeyî ne û bangî navê îlahê xwe bikin, lê belê agir pênexin. 26 Û gayê ku dane wan rahiştin û amade kirin û ji sibehê heta nîvroj; bi gotina: Ya Baal bersivê bide me! bangî navê Baal kirin. Lê belê deng tune bû û kesî ku bersivê bide jî tune bû. Û li dora pêşkêşîgeha ku çêkirine hol bûn. 27 Û wusa bû ku nîvrojê, Êlyas qerfê xwe bi wan re kir û got: Bi dengê bilind bang bikin, ji ber ku ew îlahek e! an li daman be, an jî li avdestxanê ye, an jî rêwîtiyê dike, dibe ku di xew de be û hişyar kirin hewce bike! 28 Û bi dengê bilind qêriyan û li

gor adetên xwe, heta ku xwîn ji
ser wan ve biherike bi şûr û riman
xwe birîndar kirin. 29 Û wusa bû
ku gava wextê nîvrojê buhurî,
heta wexta pêşkêşiya êvarê tête
pêşkêşî kirin peyxambertiyê ki-
rin; lê belê deng nîne û kesî ku
bersivê bide nîne û yê ku guh bide
jî tune bû.
30 Û Êlyas ji hemûya netewê
re got: Nêzîkî cem min bibin! û
hemû netewe nêzîkî wî bûn. Û
pêşkêşîgeha XUDAN ya xerabûyî
selihand. 31 Û li gor hejmara nîja-
dên Aqûpê ku bi gotina: Dê navê
te Îsraêl be! gotina XUDAN jê re
hatiye, Êlyas donzdeh heb kevir
rahişt. 32 Û bi wan keviran li gor
navê XUDAN pêşkêşîgehê ava
kir û li dora pêşkêşîgehê, kendekî
qasî du olçek tovê rahêle çêkir.
33 Û êzingan rêz kir û ganêr per-
çe perçe jêkir û danî ser êzingan.
Û wî got: Bi avê çar kûpî dagirin
û bi ser pêşkêşîgeha şewitandinê
û êzingan ve birijînin! 34 Û wî
got: Dubare bikin! û dubare kirin.
Û wî got: Sêbare bikin! û sêbare
kirin. 35 Û av li dora pêşkêşîgehê
herikî û kendalê jî bi avê ve dagirt.
36 Û dema pêşkêşîgeha êvarê bête
pêşkêşî kirin, wusa bû ku peyxam-
ber Êlyas nêzîk hat û got: Ya XU-
DAN Xwedayê Birahîm, Îshaq û
Îsraêl! Bila îro bête zanîn ku li Îs-
raêlê tu Xwedê yî û ez qûlê te me
û vana hemûyan bi gotina te çêki-
rim. 37 Bersivê bide min ya XU-
DAN, bersivê bide min û bila ev
netewe bizanibin ku, ya XUDAN,
tu Xwedê yî û te dilên wan şunda
vegerand! 38 Û agirê XUDAN ket
û pêşkêşiya şewitandinê û êzingan
û keviran û axê xwar û qedand û
ava di kendalê de yî alast. 39 Û
hemûya netewê dît û bi ser rû ve
ketin û gotin: XUDAN, Xwedê ye!
XUDAN, Xwedê ye! 40 Û Êlyas ji
wan re got: Bi peyxamberên Baal
ve bigirin; bila tu kes ji wan nere-
vin û xelas nebin! Û bi wan girtin û
Êlyas wan daxist newala Kîşonê û
li wir wan serjê kir.

*Dawiya Ziwabûnê*

41 Û Êlyas ji Ahab re got: Derke-
ve, bixwe û vexwe; ji ber ku dengê
zêdeyiya baranê heye. 42 Û Ahab
bona xwarin û vexwarinê derket.
Û Êlyas hilkişiya girê Karmelê û
li erdê rûnişt û wecê xwe xist nava
çongên xwe. 43 Û ji xulamê xwe
re got: De, hilkişe li rêya behrê
binêre. Û hilkişiya, nihêrt û got:
Tiştek nîne. Û heft carî jê re got:
Dîsa here. 44 Û wusa bû ku di cara
heftan de xulam jê re got: A vay,
ji behrê ve ewrek biçûk derdike-
ve, qasî kulma mirov e. Û wî got:
Hilkişe, ji Ahab re bibêje: Ereba
xwe amade bike û dakeve ku bila
baran te ji rêya te negire! 45 Û di
wê navberê de wusa bû ku ezman
bi ewran û bi ba ve tarî bûn û bara-

nek mezin çê bû. Û Ahab siwar bû û çû Yîzrêelê 46 û destê XUDAN li ser Êlyas bû û wî pişta xwe girê da û heta cîhê têketina Yîzrêelê di pêşiya Ahab de baz da.

*Reva Êlyas*

19 Û Ahab hemû kirinên Êlyas û ka peyxamberan çawa bi
şûr ve kuştine gîhand Îzebel. 2 Û
Îzebel şandiyek ji Êlyas re şand û
got: Ger sibê, heta van wextna ez canê te nekim mîna canên vana yekî, bila îlahan vêya û hîn jî jê zêdetir bi min ve bikin! 3 Û gava
vêya dît, rabû û ji ber canê xwe çû Beer-Şebayê ya bajarê Cihûdayî û xulamê xwe li wir hişt. 4
Lê belê ew bi xwe di çolê de rêya rojekê meşiya û hat û di bin darekî merxê de rûnişt û bona canê xwe mirinê xwest û got: Bes e, ya XUDAN, niha canê min bistîne, ji ber ku ez ji bapîrên xwe qenctir nîn im. 5 Û di bin darekî merxê
de raket û xew de çû a vay, milyaketek destê xwe tê da û jê re got: Rabe, xwarinê bixwe! 6 Û nihêrt
û a vay, li ber serê wî li ser kevirekî germ pîdeyek pijandî û cerek av. Û xwar û vexwar û dîsa raket.
7 Û milyaketê XUDAN cara dudan dîsa hat û destê xwe tê da û got: Rabe, xwarinê bixwe! ji ber, rêya ku tuyê here, bona te zehf dirêj e. 8 Û rabû û xwar û vexwar
û bi hêza wê xwarinê çel roj û çel şev, heta çiyayê Xwedê Horebê meşiya.

*Xudan xwe nîşanî Êlyas dide*

9 Û li wir ket şikeftekê û li wir şeva xwe buhurand û a vay, gotina XUDAN jê re hat û jê re got: Êlyas, li vê derê çi karê te heye?
10 Û wî got: Ez bona Xwedayê artêşan XUDAN, zehf xîretkarî kirim; ji ber ku lawên Îsraêl dev ji peymana te berdan, pêşkêşîgehên te xera kirin û peyxamberên te bi şûran ve kuştin û ez tenê mam û bona ku bigirin li canê min digerin. 11 Û wî got: Derkeve û li
çiyê, li ber XUDAN bisekine! Û a vay, XUDAN derbas dibû û bayek mezin û xwurt çiyayan diqelişand û zinarên li ber XUDAN in dihelisandin; lê belê XUDAN ne di ba de bû û paşî bayê erdhejîn; lê belê XUDAN ne di erdhejînê de
bû 12 û paşî erdhejînê agir; lê belê XUDAN ne di agir de bû û paşî agir dengekî zirav û biaram. 13 Û
wusa bû ku, dema Êlyas vê yekê bihîst wecê xwe bi cubba xwe ve nuxumand û derket û li ber şikeftê sekinî. Û a vay, dengek hate wî û got: Êlyas, li vê derê çi karê te heye? 14 Û wî got: Ez bona Xwedayê artêşan XUDAN, zehf xîretkarî kirim; ji ber ku lawên Îsraêl dev ji peymana te berdan, pêşkêşîgehên te xera kirin û peyxamberên te bi şûran ve kuştin û

ez tenê mam û bona ku bigirin li
canê min digerin!
15 Û XUDAN jê re got: Here, ji
rêya çolê bizivire Şamê; gava tu
bigihêje wir, tuyê Hazael li ser
Sûriyê bi qiraletiyê mesh bike
16 û Yehûyê lawê Nîmşî li ser
Îsraêlê bi qiraletî mesh bike û ji
Abel-Meholayê Elîşayê lawê
Şafat ji xwe re bi peyxambertî
mesh bike. 17 Û dê wusa bibe, yê
ku ji şûrê Hazael xelas bibe, dê
Yehû bukuje û yê ku ji şûrê Yehû
xelas bibe, dê Elîşa bukuje. 18 Lê
belê min, li Îsraêlê, hemû çongên
ji Baal re xwe danenîne erdê û her
lêvên ku wî ranemûsandine; heft
hezar kesî da sekinandin[1]!

*Banga ji Elîşa re*

19 Û ji wir çû û Elîşayê lawê
Şafat dît û ew, donzdeh cot ga
li ber, cot dikir û ew bi xwe tevî
cotê donzdehan bû û Êlyas der-
basî cem wî bû û cubba xwe avêt
ser wî. 20 Û dev ji gayan berda
û berra pêy Êlyas da û got: Ez
rica dikim, ez dayik û bavê xwe
ramûsînim û wê gavê ez ê li pêy
te werim. Û wî jê re got: Here,
vegere! ji ber ku çi bi te kirim?
21 Ji pêy wî vegeriya û cotê ga-
yan rahişt û wan serjê kir û gayan
bi taximên wan ve kelandin[2] û
goştên wan dan netewê û xwarin.
Û rabû û li pêy Êlyas çû û jê re
xizmetê kir.

*Ben-Hadat êrîşî Samiriyê dike*

20 Û qiralê Sûriyê Ben-Ha-
dad hemûya artêşa xwe
civand û tevî wî sîh û du qiral û
hesp û erebeyên cengê hebûn û
derket û dorûber li Samîriyê girt
û li dijî wê ceng kir. 2 Û şandiyan
ji bajêr re, ji qiralê Îsraêl Ahab re
şand û jê re got: Ben-Hadad wusa
dibêje: 3 Zêr û zîvê te yê min e
û jin û lawên te; herî qencên wan
yên min in. 4 Û qiralê Îsraêlê ber-
sivê da û got: Efendiyê min, ya
qiral, mîna ku tu dibêjî ye; ez û
her tiştên min yên te ne. 5 Û şandî
dîsa hatin û gotin: Ben-Hadad
wusa diaxife û dibêje: Bi rastî, bi
gotina: Tuyê zîv û zêrê xwe û jin-
ên xwe û lawên xwe bide min, ji
te re şandim; 6 lê belê sibê di van
wextan de ez ê qûlên xwe ji te re
bişînim û dê lêkolînê li mala te û
li mala qûlên te bikin û dê wusa
bibe ku, dê her tiştê ku di çavê te
de xweş e bi destên xwe bigirin
û bibin.
7 Û qiralê Îsraêlê bangî hemû ka-
lepîrên welêt kir û got: Binêrin,
ez rica dikim, bibînin, da ku, ev
zilama çawa li xerabiyê digere;

[1] An jî: Sax hiştim.

[2] Yanê bi nîrê gayan agir vêxist û bi wan ve goşt keland.

ji ber ku ji min re bona jinên min û lawên min û zîv û zêrên min şand û jê neparastim. 8 Û hemû kalepîr û hemûya netewê jê re gotin: Guhdarî neke û pê qayîl nebe! 9 Û ji şandiyên Ben-Hadad re got: Ji efendiyê min qiral re bibêjin: Her tiştên ku berê ji qûlê xwe xwestine ez ê bikim; lê belê ez nikarim vî tiştî bikim. Û şandî çûn û vê bersivê jê re anîn. 10 Û Ben-Hadad jê re şand û got: Ger axa Samîriyê, têra tijî kirina lepên netewa ku li pêy min têne bike, bila îlahan wusa û jê zêdetir bi min bikin! 11 Û qiralê Îsraêlê bersivê da û got: Bibêjin, ê ku kembera şûr li xwe şidandiye bila mîna ku wê vekiriye pesnê xwe nede! 12 Û wusa bû ku, dema vê gotinê bihîstin, Ben-Hadad û qiralên wî di çadiran de vedixwarin û ji qûlên xwe re got: Rêz bibin! Û li hember bajêr rêz girtin.

*Ahab Ben-Hadat mexlûb dike*

13 Û a vay, peyxamberek nêzîkî qiralê Îsraêlê Ahab bû û got: XUDAN wusa dibêje: Ma te vê ajaweya mezin dît? A vay, îroj ez ê wî bidim destê te û tuyê bizanibe ku ez XUDAN im! 14 Û Ahab got: Bi kê re? Û wî got: XUDAN wusa dibêje: Tevî xulamên serokên navçeyan. Û wî got: Dê kî dest bi cengê bike? Û wî got: Tu! 15 Û xulamên serokên navçeyan jimartin û du sed û sîh û du kes bûn û paşî wan hemûya netewê, hemûya lawên Îsraêl jimartin, heft hezar kes.
16 Û nîvrojê derketin. Û Ben-Hadad, bi xwe û qiralan, sîh û du qiralên ku alîkariyê pê re dikirin di çadiran de vedixwarin û serxweş dibûn. 17 Û pêşiyê xulamên serokên navçeyan derketin û Ben-Hadad zilam şand û bi gotina: Ji Samîriyê zilam derdikevin, jê re gîhandin. 18 Û wî got: Ger bona aşîtiyê derdikevin, wan bi saxîtî bigirin û ger bona cengê derkevin jî wan bi saxîtî bigirin! 19 Û vana, xulamên serokên navçeyan û artêşa ku li pêy wan tê, ji bajêr ve derketin. 20 Û her kes li yê ku li hember xwe ye xistin û yên Sûriyî reviyan û Îsraêliyan bera wan dan û qiralê Sûriyê Ben-Hadad li ser hespê, tevî siwaran reviya û xelas bû. 21 Û qiralê Îsraêlê derket û li hespan û li erebeyên cengê xist û bi lêxistinek mezin li Sûriyeyiyan[1] xist.

*Êrîşa duwemîn ya Aramiyan*

22 Û ew peyxamber nêzîkî qiralê Îsraêlê bû û jê re got: Here, xwurt bibe, ka tu dikarî çi bikî bizanibe û bibîne; ji ber ku di salvegerê de, qiralê Sûriyê dê li dijî te derkeve! 23 Û qûlên qiralê Sûriyê jê re gotin:

1 Aramiyan, an jî: Sûryaniyan.

Îlahên wan îlahên çiyayan e; ji ber
vê yekê ji me xwurttir bûn; lê belê
em bi wan re li newalê cengê bikin
û muheqeq em ê ji wan xwurttir
bin! 24 Û vê yekê bike; qiralan her
yekê ji cîhê wî rake û serokan dey-
ne cîhên wan 25 û li dêvila hespê
hesp û li dêvila erebê erebe bûnê;
mîna artêşa ku ji destê te çûye,
artêşek rêz bike û em ê li dijî wan
li newalê cengê bikin û muheqeq
em ê ji wan xwurttir bin. Û gotina
wan guhdarî kir û wusa kir.
26 Û di salvegerê de wusa bû ku,
Ben-Hadad Sûriyeyiyan jimart û
bona ku bi Îsraêlê re cengê bike,
derket Afekê. 27 Û lawên Îsraêl
hatin jimartin û zewêde çêkirin û
çûn hemberî wan û lawên Îsraêl
li hember wan, mîna du keriyê
karikan artêşgehê danîn; lê belê
Sûriyeyiyan welêt dagirtibûn.
28 Û zilamê Xwedê nêzîk bû
û ji qiralê Îsraêlê re wusa got:
XUDAN wusa dibêje: Madem
ku Sûriyeyiyan gotin: XUDAN
Xwedayê çiyayan e, ne yê newa-
lan e; ez ê hemûya vê ajaweyê bi-
dim destê te û hûn ê bizanibin ku
ez XUDAN im. 29 Û heft roj li
hember hev di artêşgehê de man.
Û wusa bû ku, di roja heftemîn de
ceng dest pê kir û lawên Îsraêl,
di rojekê de li sed hezar peyayên
Sûriyî xistin. 30 Lê belê yên ku
li pêy mane reviyan Afekê, hun-
dirê bajêr û dîwar bi ser bîst û
heft hezar kesê ku li paşê mane ve
hilweşiya. Û Ben-Hadad reviya û
ket bajêr, odeyeke navîn.
31 Û qûlên wî jê re gotin: A vay,
me bihîstin ku qiralên mala Îsraêl,
qiralên dilovan in[1]; de haydê em
pertalan[2] li piştên xwe û werîsan
li serên xwe bigerînin û derkevin
cem qiralê Îsraêlê; dibe ku canê te
sax bihêle. 32 Û pertalan li pişta
xwe û werîsan li serê xwe girêdan
û hatin û ji qiralê Îsraêlê re gotin:
Qûlê te Ben-Hadad: Ez rica dikim
canê min sax bihêle! dibêje. Û wî
got: Ma hîn ew dijî? Ew birayê
min e. 33 Û zilaman vêya nîşaneke
qenc hesibandin û ji devê wî go-
tinê girtin û gotin: Birayê te Ben-
Hadad. Û wî got: Herin, wî rahêlin
û bînin. Û Ben-Hadad derket cem
wî û Ahab wî li erebê siwar kir.
34 Û Ben-Hadad jê re got: Bajarên
ku bavê min ji bavê te stendiye
ez ê şunda bidim û mîna ku bavê
min li Samîriyê kiriye, tuyê jî li
Şamê bona xwe sûkan ava bike. Û
Ahab got: Ez ê jî te bi vê peymanê
berdim. Û pê re peymanê danî û
wî serbest berda.

*Peyxamberek Ahab tawanbar dike*

35 Û zilamek ji lawên peyxamber
bi gotina XUDAN ji hevalê xwe re

[1] Bi bexş in.

[2] Alavan.

got: Ez rica dikim, li min bixe! Û
zilam nexwest ku lê bixe. 36 Wê
gavê jê re got: Madem ku te gotina
XUDAN guhdarî nekir, a vay, çawa
ku tu ji cem min here, dê şêrek te
bukuje. Û ji cem wî çû û şêrekî wî
dît û wî kuşt. 37 Û zilamekî din dît û
jê re got: Ez rica dikim, li min bixe!
Û zilam lê xist, lê xist û wî birîndar
kir. 38 Û peyxamber çû û pêçekekê
danî ser çavên xwe û qilafetên xwe
guhert û li ser rê li benda qiral ma.
39 Û dema qiral derbas dibû, bangî
qiral kir û got: Ev qûlê te ketibû
nava cengê û a vay, zilamekî xwe
da alî û zilamekî ji min re anî û got:
Bi vî zilamî bigire; ger bireve, dê
canê te bibe berdêla canê wî, an jî
tuyê talantekî zîv bide. 40 Û ev qûlê
te dema li der û holê mijûl dibû, ew
winda bû. Û qiralê Îsraêlê jê re got:
Dê daraziya te wusa bibe; te biryarê
daye. 41 Û hema pêçekê ji çavên
xwe derxist û qiralê Îsraêlê fêhm kir
ku ew ji peyxamberan e. 42 Û jê re
got: XUDAN wusa dibêje: Madem,
zilamê ku bona helaqê danîbûm, te
ji dest ve derxist, dê li dêvila canê
wî canê te û li dêvila netewa wî ne-
tewa te bibe! 43 Û qiralê Îsraêlê bi
xeyd û bi hêrs çû mala xwe û ket
Samîriyê.

*Rezê Nabot*

21 Û paşî van tiştan wusa
bû ku, li Yîzrêelê, li cem
qesra qiralê Samîriyê Ahab, re-
zek Nabotê Yîzrêelî hebû. 2 Û
Ahab bi Nabot re axifî û jê re got:
Rezê xwe bide min, bila ji min re
bibe bostanê zerzewatê, ji ber ku
nêzîkî mala min e û li dêvila wê
ez rezekî hîn jê çêtir bidim te; an
jî ger tu bixwazî ez berdêla wê bi
zîv bidim te! 3 Û Nabot ji Ahab
re got: Bila XUDAN min biparê-
ze ku ez mêrasa bapîrên xwe bi-
dim te! 4 Û ji ber gotina ku Na-
botê Yîzrêelî jê re gotiye, Ahab
bi xeyd û bi hêrs ket mala xwe;
ji ber ku: Ez mêrasa bapîrên xwe
nadim te, gotibû. Û li ser livînên
xwe dirêj bû û wecê xwe zîvirand
û nan nexwar.
5 Û jina wî Îzebel hate cem wî û jê
re got: Ma çima ruhê te xeyidiye
û tu nan naxwî? 6 Û jê re got: Ji
ber ku ji Nabotê Yîzrêelî re gotim:
Rezê xwe bi zîv bide min; an jî
ger tu bixwaze, ez ê li dêvila wê
rezekî din bidim te û got: Ez rezê
xwe nadim te. 7 Û jina wî Îzebel
jê re got: Ma niha tu li ser Îsraêlê
qiraletiyê dikî? Rabe, nan bixwe
û bila dilê te xweş be; ez ê rezê
Nabotê Yîzrêelî bidim te. 8 Û bi
navê Ahab nameyan nivîsand û
wan, bi mora wî mor kirin û na-
meyan ji kalepîr û pêşhatiyên ku
li bajarê Nabot in û pê re rûdinin
re şandin. 9 Û bi gotina: Rojiyekê
bang bikin û Nabot li ber netewê
bidin rûniştin 10 û li hember wî
du zilamî, du zilamê bêkêr bidin

rûniştin û bila bi gotina: Te kufrê
ji Xwedê û qiral re kiriye! li dijî wî
şahdeyiyê bikin û wî derxin derve
û wî bidin ber keviran ku bila bi-
mire, di nameyan de nivîsand.
11 Û zilamên bajarê Nabot, ka-
lepîrên ku di bajarê wî de rûdinin
û yên ku pêş ve tên, li gor ku Îze-
bel ji wan re şandiye, mîna ku di
nameyên ku ji wan re şandine de
nivîsandî ye kirin. 12 Rojiyê bang
kirin û Nabot li cîhê serîkê netewê
dan rûniştandin. 13 Û du zilam,
du zilamê bêkêr hatin û li hember
wî rûniştin û van zilamên bêkêr li
ber gel, li dijî wî, li dijî Nabot, bi
gotina: Nabot ji Xwedê û ji qiral
re kufrê kir! şahdeyiyê kirin. Û wî
derxistin derveyî bajêr û wî dan
ber keviran û mir! 14 Û ji Îzebel
re şandin û gotin: Nabot hat reci-
mandin û mir. 15 Û wusa bû ku
dema Îzebel bihîst ku Nabot hati-
ye kevir kirin û miriye, Îzebel ji
Ahab re got: Rabe û rezê Nabotê
Yîzrêelî, ê ku bi zîvan nexwest
bide te, ji xwe re bike milk; ji ber
ku Nabot ne sax e, lê belê miriye!
16 Û wusa bû, dema Ahab bihîst
ku Nabot miriye, bona ku rezê Na-
botê Yîzrêelî ji xwe re bike milk,
bona ku dakeve wir Ahab rabû.
17 Û vê gotina XUDAN ji Êlyasê
Tîşbeyî re hat: 18 Rabe, bona
pêşwaziya qiralê Îsraêlê Ahab, ê
ku li Samîriyê rûdine dakeve; a
vay, ew li rezê Nabot e; bona ku
wê bike milk daket wir. 19 Û tuyê
pê re biaxife û bibêje: XUDAN
wusa dibêje: Ma te kuşt û te ji xwe
re kir milk? Û tuyê pê re biaxife
û bibêje: XUDAN wusa dibêje:
Dê li cîhê ku kûçik xwîna Nabot
dialêsin, ya te, xwîna te jî kûçik
bialêsin. 20 Û Ahab ji Êlyas re
got: Ya neyarê min, ma te min dît?
Û wî got: Te dîtim, ji ber, bona
ku tu ya di çavê XUDAN de xe-
rab e bikî, te xwe firot! 21 A vay,
ez ê asîwê bi ser te ve bînim û te
bimalim û bavêjim û li Îsraêlê di-
xwaze bila qûl bibe û dixwaze bila
azad bibe, ez ê ji Ahab her zilamî
jê bikim û bavêjim 22 û ji ber ku
te min hêrs kir û bi Îsraêlê ve sûcê
da kirin, ez ê mala te, mîna mala
Yeroboamê lawê Nebat û mîna
mala Baaşayê lawê Ahiya bikim.
23 Û XUDAN bona Îzebel jî axifî
û got: Dê li cem dîwarê Yîzrêelê
kûçik Îzebel bixwin. 24 Dê yê li
bajêr ji Ahab mirine kûçik bixwin
û dê ên ku li beyarê bimirin, ci-
vîkên ezmanan bixwin. 25 Bona
yê ku di çavê XUDAN de xerab
e bikin, bi rastî kesî ku mîna Ahab
xwe firotiye nebû; jina wî Îzebel
wî dikişkişand. 26 Û li gor her
tiştê mekrûh ên kirina Amoriyên
ku XUDAN wan ji ber lawên Îs-
raêl qewirandibû, li pêy pûtan
çûyînê, pirr karên mekrûh kirin.
27 Û wusa bû ku, dema Ahab van
gotinan bihîstin kincê xwe çirand

û pertalekî li ser bedena xwe ve pêça û rojiyê girt û di pertalê de raket û hêdîka meşiya. 28 Û vê gotina XUDAN ji Êlyasê Tîşbeyî re hat: 29 Ahab çawa li ber min nizm bû, ma te dît? Madem ku li ber min nizm bû, ez ê asîwê di rojên wî de neynim; ez ê di rojên lawê wî de asîwê bi ser mala wî ve bînim.

*Peyxamber Mîka Ahab îkaz dike*

22 Û ew sê sal rehet rûniştin; di navbera Sûriyê û Îsraêlê de ceng tune bû. 2 Û wusa bû ku, di sala sêwemîn de qiralê Cihûda Yehoşafat daket cem qiralê Îsraêlê. 3 Û qiralê Îsraêlê ji qûlên xwe re got: Ma hûn dizanin Ramot-Gîlead ya me ye? Û em bêdeng dimînin û wê ji destê qiralê Sûriyê ve nastînin. 4 Û wî ji Yehoşafat re got: Ma tuyê bona cengê tevî min biçî Ramot-Gîleadê? Û Yehoşafat bersivê da qiralê Îsraêlê: Min mîna xwe bihesibîne, netewa min mîna netewa xwe bihesibîne, hespên min mîna hespên xwe bihesibîne.
5 Û Yehoşafat ji qiralê Îsraêlê re got: Ez rica dikim, pêşiyê gotina XUDAN bipirse. 6 Û qiralê Îsraêlê peyxamberan, qasî çar sed kesî civand û ji wan re got: Ma ez li dijî Ramot-Gîleadê herim cengê, an jî dev jê berdim? Û gotin: Here û dê Xudan wê bide destê qiral! 7 Lê belê Yehoşafat got: Ma xeynî yên ku li vir in, qey peyxamberekî dinî, yê XUDAN nîne ku em ji wî jî bipirsin? 8 Û qiralê Îsraêlê ji Yehoşafat re got: Kesekî din heye, Mîkayê lawê Îmla, em dikarin bi navdîtiya wî, ji XUDAN ve bipirsin; lê belê ez ji wî dikerihim; ji ber ku di derheqê min de ne agahiya xêrê, ya şerê dide! Û Yehoşafat got: Bila qiral wusa nebêje! 9 Û qiralê Îsraêlê bangî karmendekî kir û got: Lez bike, Mîkayê lawê Îmla bîne! 10 Û di cîhê vekirî yê ku di cîhê ketinê ya deriyê Samîriyê de ye, qiralê Îsraêlê û qiralê Cihûda Yehoşafat, bi li xwekirina kincên qiral, her yek li ser texta xwe rûniştîbûn û hemûya peyxamberan li ber wan peyxambertiyê dikirin. 11 Û Tsedekiyayê lawê Kenaan ji xwe re qiloçên hesinî çêkir û got: XUDAN wusa dibêje: Heta ku yên Sûriyî biqedin, tuyê bi van qiloçan li wan bixinî! 12 Û hemûya peyxamberan bi gotina: Hilkişe Ramot-Gîleadê û tuyê serketî be; ji ber ku dê XUDAN wî bide destê qiral, peyxambertiyê kirin.
13 Û şandiyê bona ku bangî Mîka bike, pê re axifî û jê re got: A vay, niha peyxamberan bi devekî qenciyê ji qiral re dibêjin; ez rica dikim, bila gotina te jî mîna yek ji wan e bibe û qenciyê bibêje!

14 Û Mîka got: Bona mafê XU-
DANê ku zindî ye, XUDAN çi
ji min re bibêje ez ê wê bibêjim!
15 Û hat cem qiral û qiral jê re
got: Mîka, gelo em bona ceng
kirinê herin Ramot-Gîleadê an
jî dev jê berdin? Û wî jê re got:
Derkeve û tuyê serkeftî be û dê
XUDAN wê bide destê qiral!
16 Û qiral jê re got: Ez çend cara
bi te sondê bidim dayîn ku tuyê
bi navê XUDAN xeynî rasteqîni-
yê tiştekî ji min re nebêjî? 17 Û
wî got: Min hemûya Îsraêlê, mîna
mîhên ku şivanê wan nîne û li çi-
yayan belav bûne dît û XUDAN
got: Efendiyê vana nîne; bila her
kes bi xweşiyê vegere mala xwe.
18 Û qiralê Îsraêlê ji Yehoşafat
re got: Ma ji te re: Dê di derheqê
min de ne agahiya xêrê, dê ya şerê
bide negotim? 19 Û Mîka got:
Wê gavê gotina XUDAN guhdarî
bike! XUDAN li ser textê xwe
rûniştî û hemû artêşa ezmanan
li aliyên wî yî rast û çepê sekinî
dîtim. 20 Û XUDAN got: Ma dê
kî Ahab bixapîne ku bila hilkişe
Ramot-Gîleadê û bikeve? Hine-
kan wusa û hinekan ûsa gotin.
21 Û ruhek derket û li ber XU-
DAN sekinî û got: Ez ê wî bi-
xapînim. 22 Û XUDAN jê re got:
Bi çi? Û wî got: Ez ê derkevim
û di devê hemû peyxamberan
de bibim ruhekî derewîn. Û wî
got: Tuyê bixapîne, him jî bi ser
wî bikeve; derkeve û wusa bike!
23 Û niha, a vay, XUDAN ruhekî
derewîn xistiye devê hemû pey-
xamberên te; XUDAN di derheqê
te de şer gotiye!
24 Û Tsedakiyayê lawê Kenaan
nêzîk hat, li gepa Mîka xist û got:
Ma Ruhê XUDAN bona ku bi te
re biaxife, ji min ji kîjan rêyê ve
derbasî te bû? 25 Û Mîka got: A
vay, tuyê roja ku tu xwe veşêre,
bikeve odeyekê navîn bibînî!
26 Û qiralê Îsraêlê got: Mîka bi-
gire û wî ji Amonê serokê bajêr
û Yoaşayê lawê qiral re şunda
vegerîne 27 û bibêje: Qiral wusa
dibêje: Viya bavêjin girtîgehê û
heta ku ez bi xweşiyê vegerim
nanê keserê bi wî re bidin xwa-
rin û ava keserê bidin vexwarin!
28 Û Mîka got: Ger tu bi xweşiyê
vegere, XUDAN bi navdîtiya min
negotiye! Û wî got: Ya neteweno,
hûn hemû bibihîzin!

*Mirina Ahab*

2.Dîr 18,28-34

29 Û qiralê Îsraêlê û qiralê Cihû-
da Yehoşafat hilkişiyan Ramot-
Gîleadê. 30 Û qiralê Îsraêlê ji
Yehoşafat re got: Ez ê qilafetê
xwe biguherim û bikevim cengê;
lê belê tu kincê xwe yî qiraletiyê
li xwe bike. Û qiralê Îsraêlê qila-
fetê xwe guhert û ket cengê. 31 Û
qiralê Sûriyê ji sîh û du serokên
erebeyên cengê re bi gotina: Ne

bi biçûkan û ne jî bi mezinan re cengê bikin, lê bi qiralê Îsraêlê re cengê bikin! emir kiribû. 32 Û wusa bû ku, dema serokên erebeyan Yehoşafat dîtin gotin: Muheqeq qiralê Îsraêlê ev e! û bona ku li dijî wî cengê bikin, berê xwe dan wî aliyî û Yehoşafat qêriya.
33 Û wusa bû ku, dema serokên erebeyan dîtin ku ew ne qiralê Îsraêlê ye, ji pêy wî vegeriyan.
34 Û zilamek, bêyî nîşangirtinê kevana xwe şidand û ji cîhên ku zirx digihêjin hev li qiralê Îsraêlê xist û qiral ji erebevanê xwe re got: Hefsarê bizivirîne û min ji artêşê ve derxîne; ji ber ku ez birîndar bûm. 35 Û ceng wê rojê dijwar bû û li hember Sûriyeyiyan qiral, di erebeya xwe yî cengê de sekinandin û êvarê mir û xwîna birînê bi hundirê erebê ve herikî.
36 Û gava roj diçû ava di nava artêşê de bi gotina: Her kes bila here bajarê xwe û her kes vegere welatê xwe! qêrînek çêbû.
37 Û qiral mir û wî anîn Samîriyê û qiral li Samîriyê binerd kirin.
38 Û erebeyê li cem burka Samîriyê şuştin. Û fahîşe li wir xwe duşiştin û li gor gotina ku XUDAN gotibû kûçikan xwîna wî alastin. 39 Û karên Ahab yên li pêy mane û her tiştên ku kiriye û xaniyê ku ji diranê fîlan çêkiriye û hemû bajarên ku ava kiriye, ma vana di Pirtûka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê de ne nivîsandîne? 40 Û Ahab bi bapîrên xwe re raket; dêvila wî lawê wî Ahazya bû qiral.

*Qiraletiya Yehoşafat*
2.Dîr 17-20

41 Û di sala çaremîn ya qiralê Îsraêlê Ahab de, Yehoşafatê lawê Asa, li ser Cihûda bû qiral.
42 Dema Yehoşafat bû qiral sîh û pênc salî bû û li Orşelîmê bîst û pênc sal qiraletiyê kir. Û navê dayika wî Azûbaya qîza Şîlhî bû.
43 Û di rêya bavê xwe Asa de meşiya û bi-çêkirina ya ku di çavê XUDAN de rast e, jê çewt nebû; lê cîhên bilind ji holê ve nehatin rakirin; netewe hîn li cîhên bilind qurbanan jê dikirin û buxurê vêdixistin. 44 Û Yehoşafat bi qiralê Îsraêlê re aştiyê pêk anî.
45 Û karên Yehoşafat ên li pêy mane û hêza wî ya ku nîşan dayiye û ka çawa ceng kiriye, ma di Pirtûka Dîrokan ya qiralên Cihûda de ne nivîsandîne? 46 Û bermayiyên zilamên ku bona fuhşê hatine weqif kirin ên ku ji rojên bavê wî Asa ve hatine hiştin ji welêt ve maliştin û avêtin. 47 Û li Edomê qiral tunebû; wekîlekî qiral hebû.
48 Yehoşafat, bona ku ji bo zêr herin Ofîrê, keştiyên Tarşîşê çêkir; lê belê neçûn ji ber ku keştî li Etsyon-Geberê perçe bûn. 49 Wê gavê Ahazyayê lawê Ahab ji Yehoşafat re got: Bila di keştiyan de qûlên

min bi qûlên te re herin. Lê belê
Yehoşafat nexwest.
50 Û Yehoşafat tevî bapîrên xwe raket û li bajarê bapîrê xwe Dawid li cem bapîrên xwe hate binerd kirin û li dêvila wî lawê wî Yehoram bû qiral.

*Qiraletiya Ahazya*

51 Di hifdeh saliya qiralê Cihûda Yehoşafat de, Ahazyayê lawê Ahab li Samîriyê, li ser Îsraêlê bû qiral.
52 Û yê ku di çavê XUDAN de xerab e kir û di rêya bavê xwe de û di rêya diya xwe de û di rêya Yeroboamê lawê Nebatê ku bi Îsraêlê sûc dayiye kirin de meşiya.
53 Û ji Baal re qûlitiyê kir û bi wî peristinê kir û li gor her tiştên ku bavê wî kiriye, Xwedayê Îsraêl XUDAN hêrs kir.

# 2. QIRALAN

*Pêşgotin*

Kitêba 2.Qiralan, dîroka qiraletiyên Îsraêl û Cihûdayê, ji cîhê ku di pirtûka 1. Qiralan de maye didomîne. Mirov dikare mîna du beşî lêkolînê li kitêbê bike:

1.Dîroka du qiraletiyan. Ji navbera sedsala B.Z. 9'an de ketina Samîriyê, heta gelê Îsraêlê (qiraletiya Bakur) bi Asûrê ve têne sirgûn kirin (B.Z. 722)
2.Dîroka qiraletiya Cihûdayê ji têkçûna qiraletiya Îsraêlê, heta Nebûkadnetsarê Qiralê Babîlê, Orşelîmê bi dest ve dixe û xera dike û gelê Îsraêlê bi Babîlê ve dajo (B.Z. 586). Kitêb bi kuştina Gedalyayê waliyê Cihûdayê ya di bin serweriya Babîlê de yî û'bi agahiya ji girtîgeha Babîlê serbest berdana Yehoyakînê Qiralê Cihûdayê ve diqede.

Ev bêtariyên netewî ji ber bêîtaetiya qiralê Cihûda û Îsraêlê û gelên wan têne jiyandin. Bi têkçûna Orşelîmê ve sirgûniya gellek kesî, di dîroka Îsraêlê de mîna xalikek girîng cîh digire.

Di pirtûka 2.Qiralan de du peyxamberên herî girîng Elîşayê derbasî cîhê Êlyas bûye û Îşaya ye.

*Xetên Bîngehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-17:41 | Qiralên ku Feliqîne |
| a. 1:1-8:15 | Peyxamber Elîşa |
| b. 8:16-17:4 | Qiralên Cihûda û Îsraêlê |
| c. 17:5-41 | Ketina Samîriyê |
| 18:1-25:30 | Qiraletiya Cihûdayê |
| a. 18:1-21:26 | Ji Hîzkiya heta Yoşiya |
| b. 22:1-23:30 | Qiraletiya Yoşiya |
| c. 23:31-24:20 | Qiralên Cihûdayê yên dawîn |
| ç. 24:1-30 | Ketina Orşelîmê |

*Xudan Qiral Ahazya dide cezakirin*

1 Û paşî mirina Ahab, Moab
li dijî Îsraêlê serî hilda. 2 Û
Ahazya li Samîriyê, li odeya xwe
yî jorîn, ji şivaka bi qefes ket û
nexweş bû û bi gotina: Herin û ji
îlahê Ekronê Baal-Zebûb ve bi-
pirsin; gelo ez ê ji vê nexweşiya
xwe rehet bibim? şandiyan şand.
3 Û milyaketê XUDAN ji Êl-
yasê Tîşbeyî re got: Rabe û bona
pêşwaziya şandiyên qiralê Samîri-
yê derkeve û ji wan re bibêjê: Qey
ji ber ku li Îsraêlê Xwedê nîne ku
hûn diherin û hûn ê ji îlahê Ekronê
Baal-Zebûb ve bipirsin? 4 Û ji ber
vê yekê XUDAN wusa dibêje:
Tuyê ji livînê ku tu hilkişiyayî ser
danekeve, ji ber ku muheqeq tuyê
bimire! Û Êlyas çû.
5 Û şandî vegeriyan cem qiral û wî
ji wan re got: Ma çima hûn şunda
vegeriyan? 6 Û jê re gotin: Zila-
mek bona pêrgîniya me derket û ji
me re got: Herin û ji qiralê ku we
şandine re vegerin û jê re bibêjin:
XUDAN wusa dibêje: Ma qey
ji ber ku li Îsraêlê Xwedê nîne te
bona ku ji îlahê Ekronê Baal-Ze-
bûb ve bipirse şandiyan şandin?
Ji ber vê yekê tuyê ji livînê ku tu
hilkişiyayî ser danekeve, ji ber ku
tuyê muheqeq bimire! 7 Û ji wan
re got: Yê ku derket pêrgîniya we û
yê ku van gotinan ji we re got, zila-
mekî çawa bû? 8 Û jê re gotin: Zi-
lamekî bi pirç bû û şûtikek ji çerm
li pişta wî girêdayî bû. Û got: Ew,
Êlyasê Tîşbeyî ye.
9 Û serekê pênciyekî û pêncî zi-
lamên xwe jê re şand. Û hilkişiya
cem wî û a vay, li serê çiya rûniştî
bû. Û jê re got: Ya zilamê Xwedê!
Qiral: Dakeve! got. 10 Û Êlyas ber-
sivê da û ji serekê pênciyan re got:
Ger ez zilamê Xwedê bim, bila ji
ezmanan agir dakeve û te û pêncî
zilamê te bixwe û biqedîne! Û ji
ezmanan agir daket û wî û pên-
cî zilamên wî xwarin û qedandin.
11 Û dîsa jê re serekê pênciyekî din
û pêncî zilamên xwe şand. Û bersi-
vê da û jê re got: Ya zilamê Xwedê!
qiral wusa dibêje: Zû dakeve! 12 Û
Êlyas bersivê da û ji wan re got: Ger
ez zilamê Xwedê bim, bila ji ezma-
nan agir dakeve û te û pêncî zilamê
te bixwe û biqedîne! Û agirê Xwe-
dê ji ezmanan daket û wî û pêncî
zilamên wî xwarin û qedandin.
13 Û dîsa serekê pênciyekî sêwemîn
û pêncî zilamên xwe jê re şand. Û
serekê pênciyan yê sêwem hilkişiya
û hat û li ber Êlyas û li ser çongên
xwe, xwe da erdê û lava jê re kir
û got: Ya zilamê Xwedê, ez rica
dikim, canê min û canê van pêncî
qûlên te bila di çavên te de biqîmet
bin! 14 A vay, ji ezmanan ve agir
daket û her du serekê pênciyên ku
berê hatibûn û pêncî zilamên her
yekî xwar û qedandin û niha bila
canê min di çavê te de biqîmet be!
15 Û Milyaketê XUDAN ji Êlyas

re got: Tevî wî dakeve; ji wî me-
tirse! Û rabû û bi wî re daket cem
qiral. 16 Û jê re got: XUDAN
wusa dibêje: Ma qey ji ber ku li
Îsraêlê Xwedayê ku tu gotina xwe
jê bipirse nîne, te şandiyan şand
ku ji îlahê Ekronê Baal-Zebûb ve
bipirsin? Ji ber vê yekê, tuyê ji li-
vînê ku tu hilkişiyayî ser daneke-
ve; ji ber ku tuyê muheqeq bimire!
17 Û li gor gotina XUDAN ya
Êlyas gotibû qiral mir. Û ji ber
ku lawê wî tune bû, Yehoram
li dêvila wî bû qiral; ev jî di sala
duwemîn ya lawê Yehoşafatê qi-
ralê Cihûdayê Yehoram de bû.
18 Û karên Ahazya, ên li pêy mane,
ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Îsraêlê de ne nivisandîne?

*Êlyas bi Ezmanan ve têtê kişandin*

2 Û wusa bû ku, dema dê
XUDAN bi bahozê Êlyas
hilkişanda ezmanan, dema Êlyas
û Elîşa ji Gîlgalê diçûn, 2 Êlyas ji
Elîşa re got: Ez rica dikim, li vir
bimîne; ji ber ku XUDAN min
heta Beytelê şand. Û Elîşa got:
Bona mafê XUDANê ku zindî ye
û bona mafê jiyana canê te, ez te
bernadim! Û daketin Beytelê. 3 Û
lawên peyxamberên ku li Beytelê
bûn hatin cem Elîşa û jê re gotin:
Ma tu pê dizanî, dê îroj XUDAN
efendiyê te ji serê te rake? Û got:
Ez jî dizanim, hiş bin! 4 Û Êlyas
jê re got: Ya Elîşa, ez rica dikim li
vir bimîne; ji ber ku XUDAN min
şand Erîhayê. Û got: Bona mafê
XUDANê ku zindî ye û bona mafê
jiyana canê te, ez te bernadim! Û
hatin Erîhayê. 5 Û lawên peyxam-
berên ku li Erîhayê bûn nêzîkî
Elîşa bûn û jê re gotin: Ma tu pê
dizanî, dê îroj XUDAN efendiyê
te ji serê te rake? Û got: Ez jî di-
zanim, hiş bin! 6 Û Êlyas jê re got:
Ez rica dikim, li vir bimîne; ji ber
ku XUDAN min şand Urdunê. Û
got: Bona mafê XUDANê ku zindî
ye û bona mafê jiyana canê te, ez te
bernadim! Û her du çûn. 7 Û pêncî
kes ji lawên peyxamber çûn û li dûr
ve li hemberî wan sekinîn û her du
jî li cem Urdunê sekinîn. 8 Û Êlyas
cubba xwe rahişt û wê li hev da û
li avê xist û av bi vî alî û li wî alî
bûn du parî û her du jî derbasî cihê
ziwa bûn. 9 Û wusa bû ku, dema
derbas bûn Êlyas ji Elîşa re got:
Berî ku ez ji cem te bêm stendin ez
çi ji te re bikim, bixwaze! Û Elîşa
got: Ez rica dikim, bila ji ruhê te du
para min hebe! 10 Û got: Te tiştekî
dijwar xwest! Ger dema ez ji cem
te bêm stendin tu min bibîne, dê ji
te re wusa bibe û ya na yê nebe!
11 Û wusa bû ku, dema ew
dimeşiyan û diaxifîn, a vay, ere-
beyek ji agir û hespên ji agir û her-
duyan ji hev cuda kirin û Êlyas di
bahozê de hilkişiya ezmanan. 12 Û
Elîşa dît û bang kir: Bavo, ya bavo!
Ereba Îsraêlê û siwarên wî!

Û êdî wî nedît û bi kincê xwe ve
girt û wan çirand û kir du parî.
13 Û cubba ku ji ser Êlyas ve ke-
tiye rahişt û şunda vegeriya û li
qeraxa Urdunê sekinî 14 û cubba
ku ji ser Êlyas ve ketiye rahişt û
li avê xist û got: XUDANê Êlyas
Xwedê li ku derê ye? Gava wî jî li
avê xist; av bi vî alî û li wî alî bûn
du parî û Elîşa derbas bû.
15 Û lawên peyxamberên li
Erîhayê bûn, wî ji hember ve dîtin
û gotin: Ruhê Êlyas bi ser Elîşa ve
daket! Û bona pêrgîniya wî hatin
û heta erdê jê re xwar bûn. 16 Û jê
re gotin: A vay, li cem van qûlên
te, pêncî zilamên dijwar hene, em
rica dikin, bila herin û li efendiyê
te bigerin, dibe ku Ruhê XUDAN
wî rakiribe û avêtibe ji çiyayan
çiyayekî an jî newalekî. Û got:
Neşînin! 17 Û ewqasî zorê dane
wî ku, şerm kir û got: Bişînin! Û
pêncî zilamî şandin û sê rojê lê
geriyan, lê belê wî nedîtin. 18 Û
vegeriyan cem wî û ew bi xwe jî
li Erîhayê rûdinişt û ji wan re got:
Ma ji we re: Neçin negotim?

*Elîşa ava qirêj paqij dike*

2.Mûs 15,23-26

19 Û zilamên bajêr ji Elîşa re go-
tin: A vay, em rica dikin, cîhê bajêr
mîna ku efendiyê me dibîne qenc e;
lê belê av xerab in û erd berê xwe
davêje. 20 Û got: Feraxekî nû ji min
re bînin û xwê têxin hundirê wê! Û
jê re anîn. 21 Û hilkişiya çavkani-
ya avan û xwê avêt wir û got: XU-
DAN wusa dibêje: Min van avan
qenc kir; êdî dê ji wir mirin û zad
avêtin nebe. 22 Û li gor gotina ku
Elîşa gotiye av heta îroj qenc in.

*Zarokên ku qerfan li Elîşa dikin*

2.Dîr 36,16

23 Û ji wir hilkişiya Beytelê û
dema di rê de hildikişiya, ji bajêr
ve zarokên biçûk derketin û qerfên
xwe bi wî kirin û jê re gotin: Der-
keve, ser tasik! Derkeve, ser tasik!
24 Û zîvirî paşê xwe û wan dît û bi
navê XUDAN naletê li wan kir.
Û ji daristanê du hirçên mê derke-
tin û ji wan çel û du zarokî çiran-
din. 25 Û ji wir çû çiyayê Karmelê
û ji wir jî vegeriya Samîriyê.

*Serîhildana Moabiyan*

3 Û di hîjdeh saliya qiralê Cihûda
Yehoşafat de, Yehoramê lawê
Ahab li Samîriyê li ser Îsraêlê bû
qiral û donzdeh sal qiraletiyê kir.
2 Û yê ku di çavê XUDAN de xerab
e kir, lê ne mîna dayik û bavê xwe
bû; ji ber kevirê çikandî yê Baalê
ku bavê wî çêkiribû ji holê rakir.
3 Lê belê bi sûcê ku Yeroboamê
lawê Nebat bi Îsraêlê ve dayiye ki-
rin, girêdayî ma; ji wan neqetiya.
4 Û Meşayê qiralê Moabê xwedî
dewar bû û tevî hiriyê wan, sed
hezar berxik û sed hezar beran
dida qiralê Îsraêlê. 5 Û wusa bû

ku, gava Ahab mir, qiralê Moabê
li dijî qiralê Îsraêlê serî hilda. 6 Û
wê gavê Yehoram ji Samîriyê der-
ket û hemûya Îsraêlê jimart. 7 Û çû
û ji qiralê Cihûdayê Yehoşafat re,
bi gotina: Qiralê Moabê li dijî min
rabû; ma tuyê bona ku em li dijî
Moabê cengê bikin, bi min re here?
zilam şand. Û got: Ez ê derkevim,
min mîna xwe bihesibîne, netewa
min mîna netewa xwe bihesibîne,
hespên min mîna hespên xwe bi-
hesibîne. 8 Û got: Ma em ji kîjan
rêyê ve derkevin? Û got: ji rêya
çola Edomê ve! 9 Û qiralê Îsraêlê
û qiralê Cihûda û qiralê Edomê çûn
û ji rêya fetlanok heft roj meşiyan
û bona artêşê û bona heywanên ku
li pêy wan dihatin av tunebû. 10 Û
qiralê Îsraêlê got: Hey wax! Ji ber,
XUDAN, bona ku van her sê qi-
ralan bide destê Moabê wan bangî
cem hev kiriye! 11 Û Yehoşafat
got: Ma li vir peyxamberek XU-
DAN nîne ku em bi navdîtiya wî ji
XUDAN bipirsin? Û yek ji qûlên
qiralê Îsraêlê bersivê da û got:
Elîşayê lawê Şafat li vir e, wî avê
li destê Êlyas dikir! 12 Û Yehoşafat
got: Gotina XUDAN di wî de ye!
Û qiralê Îsraêlê û Yehoşafat û qi-
ralê Edomê daketin cem wî.
13 Û Elîşa ji qiralê Îsraêlê re got:
Ma çi yê te ji min e? Here peyxam-
berên bavê xwe û peyxamberên
dayika xwe! Û qiralê Îsraêlê jê re
got: Na, ji ber, bona ku XUDAN
bide destê Moabê, van her sê qiralan
bangî cem hev kiriye! 14 Û Elîşa
got: Bona mafê XUDANê artêşan
yê zindî, yê ku ez li ber sekinîme,
ger ez bi xwe li xatirê qiralê Cihû-
dayê Yehoşafat nenihêrtîbûma, li te
nedinihêrtim û te nedidîtim! 15 Û
niha zilamekî ku li sazê dixe ji min
re bînin. Û wusa bû ku, dema zi-
lamê dikarîbû li sazê bixe, lê dixist
destê XUDAN hate ser wî. 16 Û
got: XUDAN wusa dibêje: Vê ne-
wala kortik-kortikî bikin! 17 Ji ber
ku XUDAN wusa dibêje: Hûn ê ba
nebînin û hûn ê baranê nebînin; lê
belê dê ev newala bi avê ve tijî bibe
û hûn û keriyên we û heywanên we
vexwin. 18 Û di çavê XUDAN de
ev tiştekî hêsan e; dê Moabê jî bide
destên we. 19 Û hûn ê li her bajarên
bi dîwar û her bajarên bijartî bixin û
hûn ê her darê qenc jê bikin û hemû
çavkaniyên avan bigirin û her ze-
viya qenc bi keviran ve xera bikin.
20 Û wusa bû ku, sibehê
dema pêşkêşî kirina pêşkêşiya
şewitandinê, a vay, ji rêya Edomê
av hatin û erd bi avê ve tijî bû.
21 Û hemûya Moabê bihîstin ku
qiral bona ku li dijî wî cengê bikin
derketine û hemû zilamên ku çek
şidandine û yên temena[1] wan hûn
jî mezin in, li cem hev civiyan û
li sînorê sekinîn. 22 Û sibehê zû
rabûn û roj li ser avê ve dibiriqî

1 Emr.

û Moabiyan, ji hember ve avan
mîna xwînê sor dîtin 23 û gotin:
Ev xwîn e! muheqeq qiral helaq
bûne û li xwe bi xwe xistine û
niha, ya Moab, haydê herin talanê!
24 Û hatin artêşgeha Îsraêlê û Îs-
raêlî rabûn û li Moabiyan xistin
û ji ber wan reviyan û bi lêxisti-
na Moabiyan di welêt de pêş ve
çûn. 25 Û bajaran xera kirin û her
kes kevirên xwe avêtin her zeviya
qenc û wir tijî kirin û hemû çav-
kaniyên avê girtin û hemû darên
qenc jê kirin, ewqas ku tenê li Kîr-
Haresetê kevirên wê hiştin; lê belê
kevkanîkvanan dora wê jî girtin û
lê xistin. 26 Û dema qiralê Moa-
bê dît ku ceng bona wî dijwar e,
bi ser qiralê Edomê ve, bona ku
biqelişîne û bireve heft sed kesên
ku şûr bi wan re ne girt cem xwe;
lê belê hêz neanîn ku bikin. 27 Û
lawê xwe yê yekem, ê ku dê der-
basî cîhê xwe bibe girt û wî li ser
dîwêr, wekî pêşkêşiya şewitandinê
pêşkêş kir. Û li dijî Îsraêlê hêrsek
mezin bû û ji cem wê koç kirin û
vegeriyan welatên xwe.

*Alîkariya Elîşa, ji jinebiyek xizan re*

4 Û jinikek ji jinên lawên pey-
xamber, ji Elîşa re qêriya û
got: Mêrê min, qûlê te, mir û tu
dizane ku ew qûlê te ji XUDAN
ve ditirsiya û du lawên min ên ku
deyndar in, bona ku jê re bibin
kole hate ku wan bigire! 2 Û Elîşa
jê re got: Ez çi ji te re bikim? Ka ji
min re bibêje; li malê çiyî te heye?
Û pîrekê got: Xeynî zeyta qasî ca-
rekî têdayînê tu tiştekî vê cariya
te li malê nîne. 3 Û got: Here, ji
derve ji hemû cîranên xwe û bona
xwe feraxên vala bixweze; kêm
nestîne. 4 Û tuyê bikeve hundir û
tuyê derî li ser xwe, li ser lawên
xwe bigire û birijîne hemûya wan
feraxan û yê ku tijîbûye, tuyê dey-
ne aliyekî. 5 Û pîrek ji cem wî çû
û derî li ser xwe û lawên xwe girt
û wan feraxan jê re anîn û wê da-
girt. 6 Û wusa bû ku, dema ferax
tijî bûn, ji lawê xwe re: Feraxekî
din ji min re bîne. Û lawê wî jê re
got: Êdî ferax nema. Û zeyt hate
birrîn[1]. 7 Û pîrek hat û ji zilamê
Xwedê re gîhand. Û wî got: Here,
zeytê bifiroşe û deynê xwe bide û
tu û lawên te, bi yê ku mayî ye
bijîn!

*Elîşa û Pîreka dewlemend ya ji Şûnemê*

8 Û di rojekî ji rojan de wusa bû
ku, Elîşa derbasî Şûnemê dibû û
li wir pîrekek dewlemend hebû û
pîrek zorê da wî ku bila nan bi-
xwe. Û wusa bû ku, her ku derbas
dibû, bona ku nan bixwe serîkî li
wir dixist. 9 Û pîrek ji zilamê xwe
re got: A vay, fêhm kirim ku ev zi-
lamê her tim ji cem me re derbas

[1] Sekiniya, an jî: Rawestiya.

dibe, zilamekî Xwedê ye. 10 Hay-
dê em bona wî li ser dîwêr odeyek
qatê jorîn ya biçûk çêbikin û bona
wî livîn û sifre û kursî û şimadankê
deynin wir û dê wusa bibe ku
dema were cem me dê bikeve wir!
11 Û di rojek ji rojan de wusa bû
ku, hate wir û ket odeya qatê jorîn
û li wir raket. 12 Û ji xulamê xwe
Gehazî re got: Bangî vê pîreka
Şûnemî bike! Û bangî wê kir û
pîrek li ber wî sekinî. 13 Û ji xu-
lamê xwe re got: Niha ji pîrekê re
bêje: Te bona me hemûya vê zeh-
metê kişandiye; bona te çi heye ku
bête kirin? Ma gelo bona te divê
ji qiral re bête gotin an jî ji serokê
artêşê re? Û pîrekê got: Ez di nava
netewa xwe de rûdinim. 14 Û got:
Ma mirov dikare bona wê çi bike?
Û Gehazî got: Lawê wê yê raste-
qîn nîne, zilamê wê jî kalepîr e!
15 Û got: Bangî pîrekê bike! Û
bangî wê kir û pîrek di derî de
sekinî. 16 Û got: Salekî din di vê
demsalê de, dê di himbêza te de
lawekî te bibe! Û pîrek got: Na,
efendiyê min zilamê Xwedê, ji ca-
riya xwe re derewan nebêje!
17 Û pîrek ducanî ma û mîna ku
Elîşa jê re gotibû, salekî din, di
wê demsalê de lawekî anî dinê.
18 Û lawik mezin bû û rojek ji ro-
jan wusa bû ku, derket cem bavê
xwe, cem oraqvanan. 19 Û ji bavê
xwe re got: Serê min, serê min!
Û bavê wî ji xulam re got: Wî ji
dayika wî re bibe. 20 Û wî rahişt û
ji dayika wî re bir û heta nîvroj li
ser çongên dayika xwe ma û mir.
21 Û dayika wî hilkişiya jor û wî
li ser livînên zilamê Xwedê dirêj
kir û derî li ser wî girt û derket. 22
Û bangî zilamê xwe kir û got: Ez
rica dikim, xulamekî ji xulamên
xwe û ji kerên xwe kerekî bişîne û
ez bazdim zilamê Xwedê û vege-
rim. 23 Û got: Ma çima tu îro diçe
cem wî? Ne serê mehê ye û ne
roja Sebtê ye. Û pîrekê got: Miraq
meke! 24 Û cilikê li kerê xist û ji
xulamê xwe re: Bajo û bimeşe;
heta ku ez ji te re nebêjim, ji bo
min ji ajotina kerê şunda neseki-
ne! 25 Û çû û gîhaşt çiyayê Kar-
melê, cem zilamê Xwedê.
Û wusa bû ku, dema zilamê Xwe-
dê pîrekê ji dûr ve dît, ji xulamê
xwe Gehazî re got: A vay, pîreka
Şûnemî li wir e! 26 Niha, de bona
pêrgîniya wê bazde û jê re bibêje:
Tu çawa yî, tu baş î? Zilamê te
qenc e? Lawik baş e? Û pîrekê
got: Qenc e! 27 Û hat çiyê, cem
zilamê Xwedê û xwe bi lingên wî
pêçand. Û Gehazî bona ku wê tehn
bide nêzîk bû û zilamê Xwedê got:
Berde! ji ber ku di hundirê wê de
canê wê bi êş e û XUDAN ji min
veşart û negîhand min. 28 Û pîrekê
got: Ma min ji efendiyê xwe law
xwest? Ma qey min negot min
nexapîne? 29 Û Elîşa ji Gehazî re
got: Pişta xwe girê bide û çoyê min

bigire destê xwe û here; ger tu rastî
zilamekî were silavê nede wî û ger
yek silavê bide te bersivê nede wî
û çoyê min deyne ser wecê lawik.
30 Û dayika lawik got: Bona mafê
XUDANê ku zindî ye û bona mafê
jiyana canê te, ez te ber nadim! Û
rabû û li pêy pîrekê çû. 31 Û Ge-
hazî ji ber wan pêş ve çûbû û çoyê
danîbû ser wecê lawik; lê belê
deng tunebû û bihîstin nîn bû. Û
bona pêrgîniya wî vegeriya û jê re
gîhand û got: Lawik hişyar nebû!
32 Û Elîşa ket malê û a vay, lawik
miribû û li ser livînên wî hatibû
dirêj kirin. 33 Û ket hundir û derî
li ser xwe girt û lava ji XUDAN re
kir. 34 Û derket û li ser lawik dirêj
bû û devê xwe danî ser devê wî û
çavên xwe li ser çavên wî û lepên
xwe danî ser lepên wî û dirêj bû û
gewda lawik germ bû. 35 Û zivirî
û li malê geh bi wî alî û geh bi vî
alî ve meşiya û hilkişiya jor û li
ser wî dirêj bû û lawik heft carî
pişkiya û lawik çavên xwe vekir.
36 Û wî bangî Gehazî kir û got:
Bangî wê pîreka Şûnemî bike! Û
bangî wê kir. Û pîrek hate cem
wî. Û Elîşa got: Lawê xwe rahêje!
37 Û pîrek hat û ket ber lingên wî
û heta erdê xwar bû û lawê xwe
rahişt û derket.

*Du Mucîzeyên din*

38 Û Elîşa dîsa hat Gîlgalê. Û
li welêt xela hebû û lawên pey-
xamber li ber wî rûniştîbûn û ji
xulamê xwe re got: Beroşa mezin
deyne û ji lawên peyxamber re
şorbê çêbike. 39 Û mirovek, bona
ku gîha bide hev derket beyarê û
mêwek beyarê dît û ji wê dawekî
tijî xiyarên beyar da ber hev û anî
û li beroşa şorbê hûr kirin; ji ber,
nizanîbûn ku çi ye. 40 Û bona
ku zilaman bixwin vala kirin. Û
wusa bû ku dema ji şorbê dixwa-
rin ew qêriyan û gotin: Di beroşê
de mirin heye, ya zilamê Xwedê!
Û jê nexwarin. 41 Û got: Wê gavê
arvan bînin! Û wê avêt beroşê û
got: Bona netewê vala bikin ku
bila bixwin. Û di beroşê de tiştekî
ku xesarê bide tune bû.
42 Û ji Baal-Şalîşa zilamek hat
û di çewalê wî de bona zilamê
Xwedê, ji nûberan, bîst hep nanê
ceh û similên genim ên teze anîn.
Û got: Bide netewê ku bila bi-
xwin! 43 Û xizmetkarê wî got:
Çi, ma ez vêya deynim ber sed
zilamî? Û got: Bide netewê ku
bila bixwin! Ji ber ku XUDAN
wusa dibêje: Dê bixwin û ji ber
xwe bihêlin! 44 Û danî ber wan û
xwarin û li gor gotina XUDAN ji
ber xwe hiştin.

*Naaman ji Cizamê xelas dibe*

5 Û serokê artêşa qiralê Sûriyê
Naaman, li cem efendiyê xwe
zilamekî mezin û birêz bû, ji ber ku
XUDAN bi navdîtiya wî xelasiyê

dabû Sûriyê û ev zilama egîdek
dilawêr bû, lê belê bi cizam bû[1].
2 Û Sûriyî bi nijdeyên êrîşbûnê
derketîbûn û ji warê Îsraêlê keçi-
kek biçûk bi dîlitî[2] anîbûn û qîzik
li cem pîreka Naaman bû. 3 Û
ji xanima xwe re got: Xwezîka
efendiyê min li ber peyxamberê li
Samîriyê ye bûba! Wê gavê dê ji
cizama wî, wî baş bikira. 4 Û Naa-
man çû, gotina qîzika ji welatê Îs-
raêlê ye, wusa wusa dibêje, gîhand
efendiyê xwe. 5 Û qiralê Sûriyê
got: Rabe, here û ez ê nameyekê
ji qiralê Îsraêlê re bişînim. Û çû
û deh talant[3] zîv û şeş hezar şekel
zêr û deh qat kincên cîgir girtin
cem xwe. 6 Û nameyê ji qiralê Îs-
raêlê re anî; wusa digot: Û niha,
dema ev name ji te re were, bona
ku tu qûlê min Naaman ji cizamê
baş bike, ji te re şandim! 7 Û wusa
bû ku, dema qiralê Îsraêlê nameyê
xwend kincê xwe çirand û wusa
got: Bona kuştin û vejînê ma ez
Xwedê me ku bona ev zilam ji
cizama xwe baş bibe, ji min re
dişîne? Lê belê fêhm bikin, ez rica
dikim û binihêrin ka çawa dixwa-
ze ku bi min re şer derxîne!
8 Û wusa bû ku, zilamê Xwedê
Elîşa dema bihîst ku qiralê Îsraêlê
kincê xwe çirandiye ji qiral re
şand û got: Ma çima te kincê xwe
çirand? Niha bila were cem min û
dê bizanibe ku li Îsraêlê peyxamber
heye! 9 Û Naaman tevî hespên xwe
û erebeyên xwe hat û li ber deri-
yê xaniyê Elîşa sekinî. 10 Û Elîşa
şandiyekî jê re şand û got: Here û
di Urdunê de heft cara xwe bişo û
dê goştê te vegere mîna halê xwe
yî berê û tuyê paqij bibe! 11 Lê
belê Naaman hêrs bû û çû û got: A
vay, min gotibû: Muheqeq dê der-
keve derve, cem min û bisekine û
bi navê XUDANê xwe Xwedê dê
bang bike û dê destê xwe li ser cîhê
bi cizam ve kil bike û yê bi cizam
baş bike! 12 Ma çemên Şamê Aba-
na û Farpar ji hemûya avên Îsraêlê
ne qenctir in? Ma ez nikarim xwe
di wan de bişom û paqij bibim? Û
zivirî û bi hêrs çû. 13 Û qûlên wî
nêzîk bûn û pê re axifîn û gotin:
Bavo, ger peyxamber tiştekî mezin
ji te re gotiba, ma te yê wê nekira?
Ka li ku ma ku ji te re: Xwe bişo û
paqij bibe! dibêje? 14 Û daket û li
gor gotina zilamê Xwedê di Urdunê
de xwe heft carî di avê de noq kir û
goştê wî, mîna goştê zarokek biçûk
hate halê xwe yî kevin û paqij bû.
15 Û tevî hemûya henga xwe ve-
geriya cem zilamê Xwedê û hat û
li ber wî sekinî û got: A vay, niha
fêhm kirim ku, Xwedê li hemûya
dinê nîne, lê tenê li Îsraêlê heye!

1 Kotî bû.
2 Bi hêsîrtî.
3 Li rasteka menan binêrin.

û niha ez rica dikim, ji vî qûlê xwe xelatekê rahêle! 16 Lê belê wî got: Bona mafê XUDANê ku zindî ye, ê ku ez li ber sekinîme ez tiştekî ranahêlim! Û bona ku bigire zorê da wî; lê belê nexwest ku bigire. 17 Û Naaman got: Ez rica dikim, qet nebe, bila bi barê du qantirî ax ji vî qûlê te re bête dayîn; ji ber ku vî qûlê te êdî ne ji îlahên din re tenê ji XUDAN re pêşkêşiya şewitandinê û qurbanan pêşkêş bike! 18 Bila XUDAN di vî karî de ji qûlê xwe re biborîne; dema efendiyê min bona ku biperiste têkeve mala Rîmmon û xwe bisipêre destê min, ez jî li mala Rîmmon xwar dibim; dema ez li mala Rîmmon xwar bibim, bila XUDAN di vî karî de ji vî qûlê xwe re biborîne! 19 Û jê re got: Bi xweşiyê here! Û ji cem wî qetiya û hinekî rê girt[1].

*Gehazî ji bo malê dinê derew dibêje*
1.Tîm 6,3-10; K.Şa 5,1-11

20 Lê belê Gehaziyê xulamê Elîşayê zilamê Xwedê got: A vay, efendiyê min bi nestendina tiştên ku bi xwe re anîne ku ji destê Naamanê Sûriyî nestend, wî parast; bona mafê XUDANê ku zindî ye, ez ê li pêy wî baz bidim û tiştekî ji wî bistînim! 21 Û Gehazî bi pêy Naaman ket. Û dema Naaman dît ku yek li pêy wî baz dide bona pêrgîniya wî bike, ji erebê daket û got: Qey xêr e? 22 Û wî got: Qencî, a vay, hema niha ji çiyayiya Efrayîmê, ji lawên peyxamber du xort hatin cem min û efendiyê min, bi gotina: Ez rica dikim, talantekî zîv û du qat kincê cîgir bide wan min şand. 23 Û Naaman got: Ji kerema xwe du talantî bigire. Û zorê da wî û di kîs de du talant zîvî girê da û tevî du qat cilên cîgir da du xulamê xwe û ji ber wî wan kişandin. 24 Û hat girê û ji destên wan stend û danî mala xwe û zilaman şand û çûn. 25 Û ket hundir û li ber efendiyê xwe sekinî. Û Elîşa jê re got: Gehazî, ji ku? Û wî got: Ev qûlê te neçû tu derî! 26 Û jê re got: Dema bona ku pêrgîniya te bike, ew zilam ji ereba xwe vegeriya, ma qey dilê min tevî te neçû? Ma dema stendina zîv û kinc û zeytûnan û rezan û mîhan û ganêran û dîlan û cariyan e? 27 Ji ber vê yekê dê cizama Naaman bi te û bi nîjada te ve abadîn bizeliqe. Û ji ber wî, mîna berfê bi cizam derket.

*Hesinê bivir derdikeve ser avê*

6 Û lawên peyxamber ji Elîşa re gotin: A vay, cîhê ku niha em li ber te rûdinin, bona me teng e. 2 Em rica dikin, em herin Urdunê û ji wir, bona me her yekî sitûnekê rahêlin û bona ku em tê de rûnin

---
1 Piçekî di rê de çû, an jî: Piçekî ji wî dûr ket.

li wir ji xwe re cîh çêbikin. Û got:
Herin! 3 Û yekî got: Keremê bike,
ez rica dikim, tevî van qûlên xwe
were! Û got: Ez ê werim! 4 Û tevî
wan çû. Û dema gîhaştin Urdunê,
daran jêkirin. 5 Û dema yekî da-
rekî dibiriya, hesinê bivir ket avê û
bang kir û got: Hey wax, efendiyê
min! Bi deyn rahiştibûm! 6 Û zi-
lamê Xwedê got: Kete ku? Û cîh
nîşanî wî da. Û darekî jêkir û avêt
wir û hesin derket ser rûyê avê. 7 Û
got: Wê rake! Û destê xwe dirêj kir
û wê rahişt.

*Artêşa Sûriyî û Elîşa*

8 Û qiralê Sûriyî, li hember Îsraêlê
ceng dikir û bi qûlê xwe re şêwirî
û got: Ez ê li filan cîhî artêşgehê
deynim. 9 Û zilamê Xwedê ji qi-
ralê Îsraêlê re şand û got: Ji wî
cîhî derbasbûnê ve xwe biparê-
ze, ji ber ku yên Sûriyî dadikevin
wir! 10 Qiralê Îsraêlê zilam şand
cîhê ku zilamê Xwedê jê re gotibû
û bona ku xwe ji wir biparêze jê
re gotibû û li wir xwe parast, ne
carekî, ne du carî. 11 Û li ser vî
karî dilê qiralê Sûriyê zehf kete
tengasiyê û bangî qûlên xwe kir û
ji wan re got: Ma ji me yê ku alî-
karê qiralê Îsraêl e kî ye, qey hûn
ê ji min re nebêjin? 12 Û ji qûlên
wî yekî got: Ne wusa ye, efendiyê
min qiral; tenê peyxamber Elîşa
yê ku li Îsraêlê ye, gotinên ku te
di odeya xwe yî raketinê de go-
tiye, digihîne qiralê Îsraêlê. 13 Û
got: Herin, binêrin, ew li ku derê
ye, bişînim ku wî bigirim. Û go-
tina: A vay, li Dotanê ye, jê re hate
gîhandin.
14 Û hespan û erebeyên cengê û
gellekî leşkeran şandin wir û şevê
hatin û dor û bera bajêr girtin. 15
Û xizmetkarê zilamê Xwedê zû
rabû û derket û a vay, li dora ba-
jêr leşker û hesp û erebe hebûn. Û
xulamê wî jê re got: Hey wax efen-
diyê min! Em ê çawa bikin? 16 Lê
belê wî got: Metirse! ji ber ku yên
bi me re ne, ji yên ku bi wan re ne
zêdetir in. 17 Û Elîşa lava kir û got:
Ya XUDAN, ez rica dikim çavên
wî veke ku bila bibîne. XUDAN jî
çavên xulam vekir û dît û a vay, li
dora Elîşa bi hesp û erebeyên agir
yên çiya tijî bûn. 18 Û jê re dake-
tin û Elîşa lava ji XUDAN re kir û
got: Ez rica dikim, bi korbûnê li vê
netewê bixe! Û li gor gotina Elîşa
bi koritiyê li wan xist. 19 Û Elîşa
ji wan re got: Rê ne ev e, bajar jî
ne ev e; li pêy min werin ku ez we
bibim cem zilamên ku hûn lê dige-
rin. Û wan birin Samîriyê.
20 Û wusa bû ku, dema ew ketin
Samîriyê Elîşa got: Ya XUDAN,
çavên vana veke ku bila bibînin!
Û XUDAN çavên wan vekir û
dîtin û a vay, li nav Samîriyê bûn.
21 Û qiralê Îsraêlê ji Elîşa re got:
Bavo, ma ez lê bixim, ma ez lê bi-
xim? 22 Lê belê wî got: Tuyê li

wan nexe; ma tu, tu carî zilamên
ku te bi şûr û kevana xwe ve hêsîr
kiriye dixî? Nan û avê deynin ber
wan ku bila bixwin û vexwin û
herin efendiyê xwe. 23 Û bona
wan gellek xwarin hate amade
kirin û xwarin û vexwarin û wan
şandin û çûn cem efendiyê xwe.
Û nijdeyê Sûriyê êdî carekî din
nehatin warê Îsraêlê.

*Xelaya li Samîriyê*

24 Û paşî van tiştan wusa bû ku,
qiralê Sûriyê Ben-Hadad hemûya
artêşa xwe civand û derket û dor
û bera Samîriyê girtin. 25 Û li
Samîriyê xelayek mezin bû û
a vay, heta seriyê kerekî derket
heyştê şekel[1] zîvî; zibila kevokekî
ya qasî parekî ji çar pariyê fera-
xekî derket pênc şekel zîvî, dor
û ber li bajêr girtin. 26 Û qiralê
Îsraêlê ji ser dîwêr derbas dibû û
pîrekek jê re qêriya û got: Efendi-
yê min qiral, alîkariyê bike! 27 Lê
belê wî got: Ma XUDAN alîkariyê
ji te re neke, ka ez ê ji ku alîka-
riyê bi te re bikim? Ji bênderê an
jî ji mahserê? 28 Û qiral jê re got:
Çiyî te heye? Û wê got: Vê pîre-
ka ji min re gotibû: Ka lawê xwe
bi min de em ê îroj bixwin û em ê
lawê min jî sibê bixwin. 29 Û me
lawê min pijand û wî xwarin û do-
tira rojê jê re gotim: Tu lawê xwe
bide ku em wî bixwin! Lê belê wê
lawê xwe veşart. 30 Û wusa bû ku,
dema qiral gotinên pîrekê bihîst
kincê xwe çirand û ew ji ser dîwêr
ve derbas dibû û netewe dîtin û a
vay, ji hundir ve di ser bedena wî
de cilik[2] hebû. 31 Û got: Ger îroj
serê Elîşayê lawê Şafat li ser wî
bimîne, bila Xwedê ya wusa û hîn
jî zêdetir bi min re bike!
32 Û Elîşa di mala xwe de rûniştîbû
û kalepîr tevî wî rûdiniştin û qiral ji
pêşiya xwe zilamekî şand; lê belê
berî ku şandî were cem wî, Elîşa ji
kalepîran re got: Ma hûn dibînin,
bona ku serê min bistîne, çawa ev
lawê qesas zilam şand? Binêrin,
dema şandî were derî bigirin û bi
derî wî tehn bidin! Ma dengê lingê
efendiyê wî ne li pêy wî ye? 33 Û
hîn bi wan re diaxifî, a vay, şandî
daket cem wî û ew got: A vay, ev
asîw ji XUDAN e; ma çima hîn ez
li benda XUDAN bim?

*Rakirina Dorlêgirtinê*

7 Û Elîşa got: Gotina XUDAN
guhdarî bikin; XUDAN wusa
dibêje: Sibê van wextna, dê di de-
riyê Samîriyê de olçekek[3] arvanê
zirav bi şekelekî û du olçek ceh bi
şekelekî bête firotin. 2 Û cenge-
warê erebeyê yê ku qiral xwe si-

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Yanê çûl.
3 Li rasteka menan binêrin.

partîbû milê wî, bersivê da zilamê
Xwedê û got: A vay, ger XUDAN
li ezmanan şivaka jî çêbike, ma
qet ev tişt dibe? Û got: A vay,
tuyê bi çavên xwe bibîne, lê belê
tuyê jê nexwe.
3 Û li cîhê ketina deriyê bajêr çar
zilamê bi cizam hebûn û ji hev û
din re gotin: Ma çima heta mirinê
em li vir rûnin? 4 Ger em bibêjin:
Bikevin bajêr, di bajêr de xela
heye û em ê li wir bimirin û ger
em li vir rûnin jî em ê bimirin. Û
niha werin em bikevin artêşa Sûri-
yeyiyan; ger me sax bihêlin, em ê
bijîn, na, ger bukujin, em ê jî bimi-
rin! 5 Û bona ku herin artêşgeha
Sûriyê di tariya êvarê de rabûn
û hatin qeraxa artêşgeha Sûriyê
û a vay, li wir tu kes tunebû. 6 Ji
ber ku Xudan şemata erebeyan û
şemateya hespan, şemata mezin
ya leşkeran bi artêşa Sûriyê ve da
bihîstin û ji hev û din re gotin: A
vay, qiralê Îsraêlê, qiralên Hîttiyê
û qiralên Misirê, bona ku bi ser
me ve bimeşin, li dijî me kirê ki-
rine. 7 Û di tariya şevê de, rabûn
û reviyan û artêşgehê mîna xwe,
çadirên xwe, hespên xwe û kerên
xwe hiştin. Û bona ku canên xwe
xelas bikin reviyan. 8 Û ev yên
bi cizam hatin qeraxa artêşgehê û
ketin çadirekê û xwarin û vexwa-
rin û ji wir kincê zîv û zêr û kinc
rakirin û çûn û veşartin û vegeri-
yan û ketin çadirek din, ji wir jî
rakirin çûn û veşartin.
9 Û ji hev û din re gotin: Em qenc
nakin; îroj roja mizgîniyê ye û
em bêdeng dimînin; ger em heta
tîrêja sibê bisekinin, dê xerabî
bigihêje me û niha werin, em he-
rin û ji maliyên qiral re bighînin.
10 Û hatin û ji dergevanên ba-
jêr re qêriyan û ji wan re gîhan-
din û gotin: Em çûn artêşgeha
Sûriyeyiyan[1] û a vay, li wir kes
tunebû û dengê mirov tunebû, lê
hespên girêdayî û kerên girêdayî
û çadirên mîna xwe hatine hiştin!
11 Û dergevan bang kir û di hun-
dir de ji maliyên qiral re gîhan-
din. 12 Û qiral şevê rabû û ji
qûlên xwe re got: Ez niha tiştê
ku yên Sûriyî ji me re kirine ji we
re bibêjim. Dizanin ku, em birçî
ne û ji artêşgehê ve derketine û
li beyarê xwe veşartine û: Dema
ew ji bajêr ve derkevin em ê wan
bi saxitî bigirin û bikevin bajêr
gotine. 13 Û yek ji qûlên wî ber-
sivê da û got: Ez rica dikim, bila
ji hespên ku li bajêr ji bermayî-
ne, pênc hebî rahêlin; a vay, ew
jî mîna hemûya civaka Îsraêlê ya
ku li bajêr mayîne ne; a vay, ew jî
mîna hemûya cemaeta Îsraêlê ya
ku helaq bûyîne ne û em bişînin û
bibînin. 14 Û bi hespan du erebe
rahiştin û qiral bi gotina: Herin
û bibînin, li pêy artêşa Sûriyê ve

[1] Aramiyan, an jî: Sûryaniyan.

wan şandin. 15 Û ji pêy wan çûn
heta Urdunê û a vay, hemûya rê
bi kinc û pertalên[1] ku dema Sûriyî
bi lez kirin û reva xwe de avêtine
ve tijî bûn. Û şandî vegeriyan û
gîhandin qiral.
16 Û netewe derket û artêşgeha
Sûriyeyiyan talan kirin. Û li gor
gotina XUDAN olçekek arvanê
zirav bi şekelekî û du olçek ceh
bi şekelekî bû. 17 Û qiral, cenge-
warê erebê, ê ku xwe li piyê wî
disipart, danî ber derî û netewe
wî di derî de eciqandin û mîna
ku dema qiral daketîbû cem zi-
lamê Xwedê, ew gotibû, mir.
18 Û li gor gotina ku, zilamê Xwe-
dê ji qiral re: Dê sibê van wextna
di deriyê Samîriyê de du olçek ceh
bi şekelekî û olçekek genimê zi-
rav bi şekelekî bibe gotibû, wusa
bû 19 û cengewarê erebê bersivê
dabû zilamê Xwedê û gotibû: A
vay, XUDAN li ezmanan şivakan
jî çêbike, ma li gor vê sozê dibe?
Û wî gotibû: A vay, tuyê bi çavên
xwe ve bibîne, lê belê tuyê jê nex-
we 20 û jê re wusa bû û netewe wî
di derî de eciqandin û mir.

*Vegera Pîreka Şûnemî*

8 Û Elîşa bi pîreka ku lawê wê
vejandibû re axifî bû û jê re go-
tibû: Rabe, tu tevî maliyên xwe here
û li cîhê ku tuyê bikaribe mêvan
bibe, mêvan be; ji ber ku XUDAN
bangî xelayekê kir û dê heft sal bi
ser welêt ve were. 2 Û pîrek rabû
û li gor gotina zilamê Xwedê kir
û tevî maliyên xwe çû û li welatê
Filistiyan heft sal mêvan bû. 3 Û
paşî heft salî wusa bû ku, pîrek ji
welatê Filistiyan vegeriya û bona
ji bo mala xwe û ji bo zeviya xwe
hawarê bike, derket cem qiral. 4 Û
qiral, bi gotina: Haydê hemû karên
mezin, ên ku Elîşa kirine ji min re
bibêje! bi xulamê zilamê Xwedê
Gehazî re diaxifiya. 5 Û wusa bû
ku, dema kirina wî ya mirî vejandi-
ye ji qiral re digot, a vay, pîreka ku
lawê wê vejandiye, bona mala xwe
û bona zeviyê xwe ji qiral re hawar
û feryadan kir. Û Gehazî got: Efen-
diyê min qiral, ew pîreka ev e, lawê
wê, ê ku Elîşa wî vejandiye jî ev e.
6 Gava qiral ji pîrekê pirsî, pîrekê
her tişt jê re vegot. Li ser vê yekê
qiral bangî karmendekî kir û vê
fermanê da: Her tiştên vê jinikê,
zeviya wê tevî hemî derametên wê
yên ku ji roja ku ji welêt ve cuda
bûye heta îroj kom bûne şunda bi-
dine wê!

*Elîşa û Ben-Hadatê Qiralê Sûriyê*
1.Qir 19,15-17

7 Û Elîşa hate Şamê û qiralê Sûri-
yê Ben-Hadad nexweş bû û bi
gotina: Zilamê Xwedê hate vir,
jê re gîhandin. 8 Û qiral ji Ha-
zaêl re got: Xelatekê bigire des-

[1] Alavên.

tê xwe û here, pêrgîniya zilamê
Xwedê bike û bi gotina: Gelo ez
ê ji vê nexweşiyê qenc bibim? bi
navdîtiya wî ji XUDAN re bipir-
se. 9 Û Hazaêl, bona pêrgîniya wî
çû û ji hemû tiştên qenc ên Şamê
çel barê devê xelat girt cem xwe
û hat û li ber wî sekinî û got: Qi-
ralê Sûriyê, lawê te Ben-Hadad, bi
gotina: Gelo ez ê ji vê nexweşiyê
qenc bibim? min ji te re şand.
10 Û Elîşa jê re got: Here, jê re
bibêje: Tuyê muheqeq qenc bibe!
Lê belê XUDAN nîşanî min da
ku dê muheqeq ew ê bimire.
11 Û wecê xwe zeximand û heta
ku ew aciz bû çavê xwe bi wî ve
beliqand û zilamê Xwedê giriya.
12 Û Hazaêl got: Ma efendiyê min
çima digirî? Û got: Ji ber ku ez bi
xerabiya ku tuyê bi lawên Îsraêl re
bike dizanim; tuyê agir bi bircên
wan bixe û xortên wanî bijartî bi
şûr ve bikuje û tuyê zarokên wan li
keviran bixe û zikên pîrekên wanî
ducanî biqelişîne. 13 Û Hazaêl got:
Ma ev qûlê te yê kûçik çî ye ku vî
tiştê mezin bike? Û Elîşa got: XU-
DAN nîşanî min da ku tuyê li ser
Sûriyê bibe qiral. 14 Û ji cem Elîşa
çû û hat cem efendiyê xwe û qiral
jê re got: Elîşa ji te re got çi? Û wî
got: Muheqeq tuyê baş bibe, vêya
ji min re got. 15 Û dotira rojê wusa
bû ku, rûberê rahişt û di avê de da-
kir û li ser wecê wî ve raxist û ew
mir û li dêvila wî Hazaêl bû qiral.

*Qiraletiya Yehoram ya Cihûdayê*

2.Dîr 21

16 Û di sala pêncan ya qiralê Îs-
raêlê Yoramê lawê Ahab de, wê
gavê Yehoşafat qiralê Cihûda
bû; Yehoramê lawê Yehoşafat li
Cihûdayê bû qiral. 17 Gava bû qi-
ral, sîh û du salî bû û li Orşelîmê
heyşt sal qiraletiyê kir. 18 Û mîna
ku mala Ahab kiribû ew jî di rêya
qiralên Îsraêlê de meşiya; ji ber
ku pîreka wî qîza Ahab bû û yê ku
di çavê XUDAN de xerab e kir.
19 Lê belê li gor ku XUDAN wad
kiriye ku dê di hemû rojên wan de
qendîlekê bide Dawid û lawên wî,
bona xatirê qûlê xwe Dawid, ne-
xwest ku Cihûdayê helaq bike.
20 Di rojên wî de Edom serî hil-
da û ji bin destê Cihûda derket
û qiralekî li ser xwe danîn. 21 Û
tevî hemû erebeyên cengê Yoram
derbasî Tsaîrê bû û şevê rabû û li
Edomiyên ku dor lê girtine û li
serokên erebeyan xist û netewe
reviya çadiran. 22 Bi vî awayî
Edom serî hilda; heta îroj ji bin
destê Cihûda derketiye. Wê gavê
Lîbna jî di yek demê de serî hil-
da. 23 Û karên Yoram ên ku li
pêy mane û her tiştên ku kiriye,
ma ew di pirtûka Dîrokan ya qi-
ralê Cihûda de ne nivîsandine?
24 Û Yoram tevî bapîrên xwe
raket û li bajarê Dawid, li cem
bapîrên xwe hate binax kirin û li
dêvila wî Ahazya bû qiral.

*Qiraletiya Ahazya ya Cihûdayê*
2.Dîr 22,1-6
25 Û di sala donzdehan ya qi-
ralê Îsraêlê Yoramê lawê Ahab
de Ahazyayê lawê Yehoramê qi-
ralê Cihûdayê bû qiral. 26 Gava
Ahazya bû qiral, bîst û du salî bû
û li Orşelîmê salekî qiraletiyê kir.
Û navê dayika wî, Atalyaya qîza
Omriya qiralê Îsraêlê bû. 27 Û di
rêya mala Ahab de meşiya û mîna
Ahab yê ku di çavê XUDAN de
xerab e kir; ji ber ku ew bi xwe
zavayê mala Ahab bû. 28 Û li Ra-
mot-Gîleadê, bona ku li dijî qiralê
Sûriyê Hazaêl cengê bike, tevî
Yoramê lawê Ahab çû û Sûriyî
Yoram bindest kirin. 29 Dema qi-
ral Yoram, li dijî qiralê Sûriyê Ha-
zaêl cengê dikir, bona ku birînên
Sûriyî li Ramayê, tê de vekirine,
li Yîzreêlê baş bibe, vegeriya. Û
Ahazyayê lawê Yehoramê qiralê
Cihûda, bona ku Yoramê lawê
Ahab bibîne, li Yîzreêlê daket, ji
ber ku ew nexweş bû.

*Yehû dibe Qiralê Îsraêlê*

9 Û peyxamber Elîşa, ji lawên
peyxamber bangî yekî kir û
jê re got: Pişta xwe girê bide û
vê şûşa rûnê bigire destê xwe
û here Ramot-Gîleadê! 2 Û
gava tu gîhaşt wir, Yehûyê lawê
Yehoşafatê, lawê Nîmşî bibîne û
bikeve hundir û wî ji nav birayên
wî rake û wî bibe odeyek navîn.
3 Û şûşa rûn rahêle û bi ser serê
wî ve birijîne û bibêje: XUDAN
wusa dibêje: Min te li ser Îsraêlê
bi qiraletî mesh kir! Û derî veke
û bireve û nesekine. 4 Û xulam,
xulamê peyxamber çû Ramot-
Gîleadê. 5 Û gîhaşt û a vay, se-
rokên leşkeran rûniştibûn û got:
Ya serok, gotinek min ji te re
heye. Û Yehû got: Ji nava me ji
kê re? Û xulam got: Ya serok, ji
te re. 6 Û Yehû rabû û ket malê
û xulam rûn bi serê wî ve rijand
û got: Xwedayê Îsraêlê XUDAN
wusa dibêje: Min te li ser netewa
XUDAN, li ser Îsraêlê bi qiraletî
mesh kir! 7 Û tuyê li mala efen-
diyê xwe Ahab bixe û ez ê bona
xwîna qûlên min peyxamberan û
bona xwîna hemûya qûlên XU-
DAN ji Îzebel tola xwe bistînim.
8 Û dê hemûya mala Ahab tune
bibe û li Îsraêlê, dixwaze bila dîl
be û dixwaze bila azad be, ez ê ji
Ahab her zilamî jêkim û bavêjim.
9 Û ez ê mala Ahab, bikim mîna
mala Yeroboamê lawê Nebat û
mîna mala Baaşayê lawê Ahi-
ya. 10 Û dê di zeviya Yîzreêl de
kûçik Îzebel bixwin û dê yê ku wê
binax bike tune be. Û derî vekir û
reviya.
11 Û Yehû derket derve, cem
qûlên efendiyê xwe û yekî jê re
got: Xêr e? Ev dîna çima hate
cem te? Û ji wan re got: Hûn bi
zilam û ka çi gotiye dizanin. 12 Û

wan gotin: Derew e! niha ji me re
bibêje! Û wî got: Bi min re axifî
û got: XUDAN wusa dibêje: Min
te li ser Îsraêlê, bi qiraletiyê mesh
kir! 13 Û her kes lez kirin, kincên
xwe rahiştin û danîn ser pêlikan,
bin wî û li boriyê xistin û gotin:
Yehû bû qiral!

*Yehû, Yoram dikuje*

2.Dîr 22,7-9

14 Û Yehûyê lawê Yehoşafatê,
lawê Nîmşî, li dijî Yoram, bi vî
awayî dek û dolabê danî. Û wê
gavê Yoram, bi xwe û hemûya
Îsraêlê, li dijî qiralê Sûriyê Ha-
zaêl, bi Ramot-Gîleadê digirtin;
15 lê belê qiral Yoram, dema li
dijî qiralê Sûriyê Hazaêl cengê
dikir birîndar ketibû, bona ku ji
birînên xwe bête baş kirin, vege-
riyabû Yîzreêlê. Û Yehû got: Ger
ev kar bi we jî rast be, bona ku
neçe û rewşê negihîne Yîzreêlê,
bila ji bajêr ve tu kesek derneke-
ve! 16 Û Yehû li erebê siwar bû
û çû Yîzreêlê; ji ber ku Yoram li
wir raketîbû. Û Ahazyayê qiralê
Cihûda, bona ku Yoram bibîne
daketîbû.
17 Û li Yîzreêlê, li ser qûleyê no-
tirvan disekinî û hatina ajaweya
Yehû dît û got: Ez ajaweyek dibî-
nim. Û Yoram got: Siwarekî rahêle
û bona pêrgîniya wan bişîne û bila
bibêje: Gelo xêr e? 18 Û zilamekî
li hespê siwar bûyî bona pêrgîni-
ya wî çû û got: Qiral gotina: Gelo
xêr e? dipirse. Û Yehû got: Ji xêrê
çi ji te re? Derbasî paşî min bibe!
Û notirvan gîhand û got: Şandî
gîhaşt wan, lê belê şûnda vena-
gere. 19 Û siwarekî din şand û
gîhaşt cem wan û got: Qiral go-
tina: Gelo xêr e? dipirse. Û Yehû
got: Ji xêrê çi ji te re? Derbasî paşî
min bibe! 20 Û notirvan gîhand û
got: Ew gîhaşt heta cem wan, lê
belê şûnda venagere û ajotin mîna
ajotina Yehûyê lawê Nîmşî ye; ji
ber ku bi dînikî dajo.
21 Û Yoram got: Erebê amade
bike! Û ereba wî amade kirin.
Û qiralê Îsraêlê Yoram û qiralê
Cihûda Ahazya, her yek di ereba
xwe de derketin û bona pêrgîniya
Yehû derketin û di zeviya Nabotê
Yîzreêlî de gîhaştin wî. 22 Û wusa
bû ku, dema Yoram Yehû dît:
Gelo xêr e Yehû? got. Û wî got:
Ma zinekarî û afsûnkariya dayika
te Îzebel ewqasî zêde ye, dê çawa
xêr bibe? 23 Û Yoram hevsarê zî-
virand û reviya û ji Ahazya re got:
Xayîntî, ya Ahazya! 24 Û Yehû
bi hemûya hêza xwe kevana xwe
kişand û Yoram ji nava her du
milên wî lêxist û tîr ji dilê wî der-
bas bû û derket û di ereba xwe de
ket. 25 Û Yehû, ji cengewarê ere-
beya xwe Bîdkar re got: Wî rake
û bavêje zeviya Nabotê Yîzreêlî û
di bîra xwe de bîne, dema ez û tu
li cem hev li pêy bavê wî Ahab

siwar dibûn, XUDAN vî barî li
ser wî bar kir: 26 Bi rastî, min do
xwîna Nabot û xwîna zarokên wî
dîtin! XUDAN dibêje: Û ez ê di
vê zeviyê de berdêla te bidim te!
XUDAN dibêje. Û niha li gor go-
tina XUDAN wî rahêle û bavêje
zeviyê!

*Kuştina Ahazyayê Qiralê Îsraêlê*

27 Û dema qiralê Cihûda Ahazya
vêya dît, ji rêya mala bexçe ve
reviya. Û Yehû bera wî da û got: Di
erebê de li wî jî bixin! Û di serberjêra
Gûr ya li cem Îbleamê ye de, li wî
xistin. Û reviya Megîddoyê û li
wir mir. 28 Û qûlên wî, wî bi erebê
birin Orşelîmê û wî di bajarê Dawid
de, li cem bapîrên wî, di gora wî de
binax kirin. 29 Û di yanzdeh saliya
Yoramê lawê Ahab de Ahazya li ser
Cihûdayê bûbû qiral.

*Kuştina Îzebel*

30 Û Yehû hate Yîzreêlê û Îzebel
bihîst û kil kişand çavên xwe û serê
xwe xemiland û ji şivakê ve nihêrt.
31 Û dema Yehû ji derî ve derbas
bû, Îzebel got: Zîmriyê efendiyê
xwe kuştiye! Xêr e? 32 Û wecê
xwe berbi şivakê rahişt û got: Kî?
Kî bi min re ye? Û du sê axayê
xesandî lê nihêrtin. 33 Û wî got:
Wê bavêjin jêr! Û wê avêtin jêr; ji
xwîna wê pişkiya ser dîwar û ser
hespan û wê perçiqandin. 34 Û ew
ket hundir û xwar û vexwar û got:
Niha li vê pîreka bi naletê binêrin û
wê binerd bikin; ji ber ku qîza qiral
e! 35 Û bona ku wê binerd bikin
çûn; lê belê xeynî serê wê û lingên
wê û lepên destê wê, tu tiştekî ji wê
nedîtin. 36 Û şûnda vegeriyan û jê
re gotin û got: Ev gotina XUDAN
e; ew bi navdîtiya qûlê xwe Êlyasê
Tîşbeyî axifî û got: Dê di zeviya
Yîzreêl de goştê Îzebel kûçik bi-
xwin 37 û dê laşê Îzebel, di zeviya
Yîzreêl de li rûyê erdê bibe mîna
sergînê, wusa ku, dê nikaribin bi-
bêjin: Ev Îzebel e!

*Kuştina Malbata Ahab*

10 Û heftê lawên Ahab li
Samîriyê hebûn. Û Yehû
nameyan ji kalepîrên ku serokên
Yîzreêlê ne û ji yên ku zarokên
Ahab mezin kirine re nivîsand û
şand Samîriyê û wusa nivîsand:
2 Dema ev name niha bigihêje
we, madem ku lawên efendiyên
we li cem we ne û erebeyên cengê
û hesp li cem we ne û bajarên we
yên bi dîwar û çekên we hene;
3 ji lawên efendiyê xwe, li yê herî
qenc û herî munasîb e binêrin
û wî deynin ser textê bavê wî û
bona mala efendiyê xwe cengê
bikin! 4 Û zehf tirsiyan û gotin:
A vay, du qiral hêz neanîn ku li
ber wî bisekinin û ma em çawa
bisekinin? 5 Û zilamê li ser mala
qiral û zilamê li ser bajêr û ka-
lepîran û yên zarokan mezin kiri-

ne ji Yehû re şandin û gotin: Em
qûlên te ne û her tiştên ku tuyê ji
me re bibêje, em ê bikin; em tu
kesî nakin qiral; yê di çavê te de
qenc e, bike. 6 Û Yehû ji wan re,
bi gotina: Ger hûn ê bi min re bi-
bin û gotinên min guhdarî bikin,
seriyên wan zilamên ku lawên
efendiyê we ne, bistînin û sibê
di van wextan de werin Yîzreêlê
cem min, cara duwemîn name ni-
vîsand. Û lawên qiral, wekî heftê
kesî, li cem mezinên bajêr ên ku
wan mezin kirine bûn. 7 Û wusa
bû ku, dema name gîhaşt wan,
lawên qiral rahiştin û wekî heftê
kesî wan serjê kirin û seriyên
wan xistin selikan û jê re şandin
Yîzreêlê. 8 Û şandiyek hat û jê re
gîhand û got: Seriyên lawên qiral
anîn. Û got: Li cîhê ketina derî,
wan mîna du komî heta sibehê
deynin[1]. 9 Û sibehê wusa bû ku,
derket derve û sekinî û ji hemûya
netewê re got: Hûn zilamên salih
in! A vay, min dek û duzenê ji
efendiyê xwe re danî û wî kuşt; lê
belê ma kî li hemûya vana xistin?
10 Niha bizanibin ku, ji gotina ku
XUDAN bona mala Ahab gotiye,
dê qet yek jî vala dernekeve; ji ber
ku XUDAN, tiştê ku bi navdîtiya
qûlê xwe Êlyas gotiye kir. 11 Û
Yehû, heta ku zilamekî Ahab bi
saxitî nehêle li Yîzreêlê, hemûyên
ku ji mala Ahab sax mayîne û
hemûyên mezinên wan û mêrivên
dostên wanî nêzîk in û li kahînên
wan xistin.

*Kuştina Merivên Qiral Ahazya*

12 Û ew rabû û çû û gîhaşt Samîri-
yê. Û Yehû di rê de dema di mala
qusandina şivanan bû, 13 rastî bi-
rayên Ahazyayê qiralê Cihûda bû
û got: Hûn kî ne? Û gotin: Em bi-
rayên Ahazya ne û bona silavdanê
lawên qiral û lawên qiralîçê dadi-
kevin. 14 Û got: Bi saxî vana bi-
girin! Û bi saxî wan girtin û wan,
çel û du kesî di kortala xaniyê
qusandinê de serjê kirin û ji wan
tu kesî bernedan.
15 Û ji wir çû û rastî Yehonadabê
lawê Rekab, ê ku bona pêrgîni-
ya wî hatibû hat û silavê lê kir û
got: Çawa ku dilê min bi dilê te
re rast e, ma dilê te jî wusa ye?
Û Yehonadab: Wusa ye! got. Wê
gavê destê xwe bide. Û destê xwe
da û wî hilkişand erebê, cem xwe.
16 Û got: Tevî min were û çavneba-
riya min ya bona XUDAN bibîne!
Û wî li ereba wî siwar kirin. 17 Û
hate Samîriyê û li gor gotina XU-
DAN ya ku ji Êlyas re gotiye, heta
ku li pêy mayînên Ahab, li Samîri-
yê helaq bike, li hemûyan xist.
18 Û Yehû hemûya netewê civand
û ji wan re got: Ahab hindikî qûli-
tiyê ji Baal re kir, lê belê dê Yehû
pirr qûlitiyê jê re bike. 19 Û niha;

1 Berdin.

bona min bangî hemû peyxam-
berên Baal, hemûyên ku peristinê
jê re dikin û hemû kahînên wî
bikin; bila tu kes kêm nebe! ji ber
ku qurbanekî minî mezin ji Baal re
heye; her kî ku kêm bibe, dê sax
nemîne! Lê belê Yehû, bona yên ku
peristinê ji Baal re dikin tune bike,
bi fenekiyê vêya kir. 20 Û Yehû
got: Bona Baal civakekê pîroz
bikin! Û bang kirin. 21 Û Yehû
şand her aliyê Îsraêlê û hemûyên
ku peristinê ji Baal re dikin hatin û
tu kesê ku nehatine nema. Û hatin
mala Baal û mala Baal heta devê
xwe tijî bû. 22 Û ji zilamê ku li
ser kincan e re got: Ji hemûyên ku
peristinê ji Baal re dikin re kincan
derxîne! Û bona wan kincan der-
xistin. 23 Û Yehû tevî Yehonadabê
lawê Rekab kete mala Baal û ji
yên ku peristinê ji Baal re dikin re
got: Lêkolînê bikin û binêrin, bila
li vir, ji qûlên XUDAN tu kes ne
bi we re be, lê belê bila tenê yên
ku peris-tinê ji Baal re dikin bi
we re bin! 24 Û bona qurbanan
û pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş
bikin, ketin hundir. Û Yehû li der-
ve, bona xwe heyştê zilamî danîbû
û got: Ji van zilamên ku ji destên
we re anîme ger kî yekî birevînî,
dê canê wî bikeve dêvila canê wî.
25 Û wusa bû ku, dema pêşkêşî
kirina pêşkêşiya şewitandinê qe-
dand, Yehû ji leşkerê revê û ji cen-
gewarên erebeyan re got: Bikevin
hundir û li wan bixin; bila tu kes
dernekeve! Û wan ji şûr ve der-
bas kirin û leşkerê revê û cenge-
warên erebê wan avêtin derve û
çûn heta bajarê mala Baal. 26 Û
senemên[1] mala Baal derxistin û
ew şewitandin. 27 Û senemê Baal
xera kirin û mala Baal xera kirin û
wê kirin rêya pêlan, heta îroj wusa
ye. 28 Bi vî awayî Yehû Baal ji Îs-
raêlê tune kir.
29 Lê ji sûcên ku Yeroboamê lawê
Nebat bi Îsraêl ve daye kirin, li
Beytelê û li Danê ji pêy golikên
zêr, ji pêy wan neqetiya. 30 Û XU-
DAN ji Yehû re got: Madem ku te
bi kirina ya di çavê min de qenc e,
başiyê kir û li gor her tiştên ku di
dilê min de ye, ji mala Ahab re kir,
dê lawên te yên nifşeya çaremîn li
ser texta Îsraêlê rûnin. 31 Lê belê
Yehû bala xwe neda ku bi hemûya
dilê xwe di zagona Xwedayê Îs-
raêlê XUDAN de bimeşe; ji sûcên
ku Yeroboam bi Îsraêlê ve dayiye
kirin neqetiya.

*Mirina Yehû*

32 XUDAN di wan rojan de dest
bi qewartina Îsraêlê kir û Hazael di
hemûya sînorên Îsraêlê de li wan
xist; 33 ji Urdunê wêdetir berbi roj-
hilatê hemûya warê Gîleadê, Ga-
diyan û Rûbeniyan û Manaşşiyan,
ji Areora li qeraxa newala Arnonê

1 Pût.

ye wêdetir Gîleadê jî Başanê jî.
34 Û karên Yehû ên ku li pêy
mane û her tiştên ku kiriye,
hemûya hêza wî, ma ew di Pirtû-
ka Dîrokan, ya qiralên Îsraêlê de
ne nivîsandîne? 35 Û Yehû tevî
bapîrên xwe raket û wî li Samîri-
yê binax kirin. Û li dêvila wî lawê
wî Yehoahaz bû qiral. 36 Û rojên
ku Yehû li Samîriyê li ser Îsraêlê
qiraletiyê kir bîst û heyşt sal bûn.

*Ahazya dest dide ser Rêvebiriyê*
2.Dîr 22,10-12

11 Û dema Atalyaya dayika
Ahazya dît ku lawê wê mir,
rabû û hemûya nifşeya qiral tune
kir. 2 Lê belê qîza qiral Yoram
û xwuşka Ahazya Yehoşeba, ji
nav lawên qiral ên ku tên kuştin,
Yoaşê lawê Ahazya, wî û pîri-
ka wî rahişt û dizîn û wan danîn
odeya livînan û wî ji Atalyayê
veşartin û bi vî awayî nehat kuştin
3 û şeş sal, bi dizîka li mala XU-
DAN tevî wî bû. Û Atalya li ser
welêt qiralîçetiyê dikir.

*Serîhildana li dijî Atalya*
2.Dîr 23

4 Û di sala heftan de Yehoyada
şand û fermandarên Kariyan û
leşkerê revê anîn û wan anîn hun-
dirê mala XUDAN û bi wan re
peymanê danî û di mala XUDAN
de bi wan sondê da xwarin û lawê
qiral nîşanî wan da. 5 Û emir da
wan û got: Tiştê ku hûn ê bikin
ev e: Di roja Sebtê de, ji sê kesên
we kesek, dê notirvaniya mala
qiral bigirin 6 û ji sisiyan yek, dê
di deriyê Sûrê de bin û ji sisiyan
yek dê di deriyê ku li paş leşkerê
revê ye de bin; bi vî awayî, bona
ku nekevin hundirê xanî hûn ê no-
tirvaniya xanî bigirin. 7 Û du li-
qên we, hemûyên ku di roja Sebtê
de derketine, dê notirvaniya mala
XUDAN li derûdora qiral bigirin.
8 Û dê çekê her kesî di destê wî de
be û dorûberê mala qiral bigirin û
yê ku têkeve refan bibe bila bête
kuştin û dema qiral bikeve û der-
keve, bi wî re bibin.
9 Û fermandaran mîna her tiştê
emir dayîna kahîn Yehoyada kirin
û her yek, zilamên xwe, ên ku roja
Sebtê ketine û roja Sebtê derketine
girtin û hatin cem kahîn Yehoya-
da. 10 Û kahîn rim û mertalên qi-
ral Dawid ên ku li mala XUDAN
in; dan fermandaran. 11 Û leşkerê
revê ji aliyê rastê xanî heta aliyê
çepê, li cem pêşkêşîgehê û xanî,
li dor û berên qiral, her kes, çekên
xwe di destê xwe de sekinîn. 12 Û
kahîn lawê qiral derxist û tacê danî
ser serê wî û şahdeyiyê da wî û wî
kirin qiral û wî mesh kirin û li çe-
pika xistin û bi gotina: Bijî qiral!
bang kirin.
13 Û dema Atalya şemateya
leşkerê revê û netewê bihîst, hate
mala XUDAN cem netewê 14 û

nihêrt û a vay, qiral li gor ûsilê li cem sitûnê sekinîbû û fermandar û borî li cem qiral bûn û netewa hemû welatî kêfxweş dibûn û borî dihatin lêxistin. Û Atalya kincê xwe çirand û qêriya: Xayîntî! Xayîntî! 15 Û Kahîn Yehoyada emir da fermandarên ku li ser leşkeran hatine danîn û ji wan re got: Wê ji nava refan derxînin û yê ku li pêy wê werin, bi şûr ve bikujin! Ji ber ku kahîn: Bila di mala XUDAN de neyê kuştin, got. 16 Û rê jê re vekirin û ji rêya cîhê ku bona ketina hespan bû, çû mala qiral û li wir hate kuştin.

*Nûjeniyên ku Kahîn Yehoyada kirine*

17 Û Yehoyada di nava XUDAN û qiral û netewê de, bona ku bila bibin netewa XUDAN, peymanê danî. Di nava qiral û netewê de jî peymanê danî. 18 Û hemûya netewa welêt çûn mala Baal û wê xera kirin; pêşkêşîgehên wê û pûtên wê perçe perçe kirin û Mattanê ku kahînê Baal e, li ber pêşkêşîgehan kuştin. Û kahîn karmendan danîn ser mala XUDAN. 19 Û fermandaran û Kariyan û leşkerê revê û netewa hemûyê welêt girtin û qiral ji mala XUDAN daxistin û ji rêya deriyê leşkerên revê ve hatin mala qiral. Û li ser texta qiralan rûnişt. 20 Û netewa hemûya welat kêfxweş bû û bajar bêdeng bû. Û Atalya li mala qiral bi şûr ve kuştibûn.

21 Dema Yehoaş bû qiral, heft salî bû.

*Yoaş Perestgehê diselihîne*

2.Dîr 24,1-16

12 Û di sala heftemîn ya Yehû de Yoaş bû qiral û li Orşelîmê çel sal qiraletiyê kir û dayika wî ji Beer-Şeba bû û navê wê Tsîbya bû. 2 Û Yoaş di hemû rojên xwe de, heta ku kahîn Yehoyada fêrî wî kir, ya ku di çavê XUDAN de rast e kir. 3 Lê cîhên bilind nehatin rakirin; netewe hîn li cîhên bilind qurbanan serjê dikirin û buxurê dişewitandin.

4 Û Yoaş ji kahînan re got: Bila her kahîn, perê her zilamê ku ji jimartinê ve derbas bûyiye, li gor qîmeta ku li wan hatiye dayîn, perê canan û hemûya perê ku bona anîna mala XUDAN ji dilê her kesî ve derketiye, hemûya perê tiştên pîroz ên ku ji mala XUDAN re tên anîn, 5 ji nasên xwe bistînin û li mala XUDAN di ku derê de derz bibînin, bila derzan biselihînin[1]. 6 Lê belê di sala bîst û sisiyên qiraletiya Yoaş de wusa bû ku, kahînan hîn derzên malê neselihandibûn. 7 Û qiral Yoaş bangî kahîn Yehoyada û kahînên din kir û ji wan re got: Ma çima hûn derizên malê ava nakin? Û niha êdî ji nasên xwe pere

1 Tamîr bikin.

nestînin, lê belê wê bona derzên
malê bidin. 8 Û bi sedema; êdî
bila ji netewê pere nestînin û ew
bi xwe derizên malê ava nekin,
kahînan razî bûn.
9 Û kahîn Yehoyada sindoqek
rahişt û qulekê di devê qapa-
xa wê de vekir û wê danî cem
pêşkêşîgehê, danî dema ketinê,
aliyê rastê û kahînên ku notir-
vanên şêmûgê bûn, hemû perê
ku tête mala XUDAN danîn wir.
10 Û wusa bû, dema dîtin ku di
sindoqê de pirr pere heye, katibê
qiral û kahînê mezin diçûn û perê
ku di mala XUDAN de ye dikirin
buxçeyekê û dijimartin. 11 Û perê
ku hatiye wezinandin didan destê
yên ku kar dikin; yên ku dest bi
karê mala XUDAN kirine; wan
jî didan xeratan û hosteyan û yên
ku di mala XUDAN de dixebiti-
yan 12 û hosteyên lêkirinê û yên
ku qewartina keviran dikin û bona
cebirandina derzên mala XUDAN
stendina beşt û kevirên qewartî û
her tiştên ku bona tamîr kirina xanî
tên serf kirin didan. 13 Lê belê ji
zîvê ku anîne mala XUDAN, bona
mala XUDAN tasên zîvî, meqes,
legan û boriyan, qet feraxek zêr an
jî feraxek zîv nehatin çêkirin; 14 ji
ber ku pere dan ên ku kar dikin û
bi wê mala XUDAN tamîr kirin.
15 Û bi zilamên, bona ku karê çê-
bikin pere dane destên wan re qet
tu carî neketin hesibandinê; ji ber
ku ew bi dilsozî dixebitîn. 16 Perê
pêşkêşiya guneh û perê qurbanên
sûcê neanîn mala XUDAN; ew ya
kahînan bû.
17 Wê gavê Hazaelê qiralê Sûri-
yê rabû û li dijî Gatê ceng kir û
wir bi dest ve xist û Hazael bona
ku hilkişe Orşelîmê berî da wir.
18 Û qiralê Cihûda Yoaş, her
tiştên pîroz ên ku qiralên Cihûda
Yehoşafat û Yehoram û Ahazya
ên ku bapîrê wî ne, wan pîroz
kirine û her tiştên ku wî bi xwe
pîroz kiriye û hemûya zêrên ku di
mala XUDAN û di mala qiral de
ne rahişt û ji Hazaelê qiralê Sûri-
yê re şand; ew jî ji Orşelîmê ve
dûr ket.
19 Û karên Yoaş ên li pêy mane û
her tiştên ku kiriye, ma di pirtûka
Dîrokan ya qiralên Cihûda de ne
nivîsandîne? 20 Û qûlên wî rabûn
û duzenê danîn û di rêya ku dadi-
keve Sîllayê de, di mala Mîllo de
li Yoaş xistin. 21Û qûlên wî Yoza-
karê lawê Şîmeat û Yehozabadê
lawê Şomer li wî xistin û mir û wî
li bajarê Dawid, li cem bapîrên wî
binax kirin û li dêvila wî lawê wî
Amatsya bû qiral.

*Qiraletiya Yehoahaz ya Îsraêlê*

13 Di bîst û sê saliya qiralê
Cihûda Yoaşê lawê Ahaz-
ya de, Yehoahazê lawê Yehû li
Samîriyê, li ser Îsraêlê bû qiral û
hivdeh sal qiraletiyê kir. 2 Û ya

ku di çavên XUDAN de xerab e
kir û li pêy sûcên ku Yeroboamê
lawê Nebat bi Îsraêlê ve dayiye
kirin meşiya û ji wan neqetiya.
3 Û hêrsa XUDAN li dijî Îsraêlê
sor bû û di hemû rojan de wan
dan dest Hazaelê qiralê Sûriyê û
destê Ben-Hadadê lawê Hazael.
4 Û Yehoahaz li ber XUDAN ge-
riya û XUDAN wî bihîst; ji ber
ku tengasiya Îsraêlê û zordestiya
ku qiralê Sûriyê dide wê dît. 5 Û
XUDAN, xelaskerekî da Îsraêlê
û ji bin destê Sûriyê derketin û
lawên Îsraêl, mîna berê di çadirên
xwe de rûniştin. 6 Lê belê ji sûcên
ku mala Yeroboam bi Îsraêlê ve
dayiye kirin neqetiyan, di wan de
meşiyan û Aşera di Samîriyê de
çikandî ma. 7 Ji ber ku xeynî pên-
cî siwarî û deh erebeyên cengê û
deh hezar peyayî ji netewê tu kesî
ji Yehoahaz re nehiştin; ji ber ku
qiralê Sûriyê wan tune kiribûn û
wan kiribûn mîna toza cercerê.
8 Û karên Yehoahaz ên li pêy mane
û her tiştên ku kiribû û hêza wî,
ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Îsraêlê de ne nivîsandîne? 9 Û
Yehoahaz tevî bapîrên xwe raket û
wî li Samîriyê binax kirin û li dêvi-
la wî lawê wî Yoaş bû qiral.

*Qiraletiya Yehoaş ya Îsraêlê*

10 Di sala sîh û heftan ya qiralê
Cihûda Yoaş de Yehoaşê lawê
Yehoahaz li Samîriyê, li ser Îsraêlê
bû qiral û şanzdeh sal qiraletiyê kir.
11 Û ya ku di çavên XUDAN de
xerab e, kir û li pêy hemû sûcên ku
Yeroboamê lawê Nebat bi Îsraêlê
ve dayiye kirin neqetiya; di wan
de meşiya. 12 Û karên Yoaş ên li
pêy mane û her tiştên ku kiriye û
hêza wî ya li dijî cenga ku bi qiralê
Cihûdan Amatsya re kiriye, ma di
pirtûka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê
de ne nivîsandîne? 13 Û Yoaş tevî
bapîrên xwe raket û Yeroboam li
texta wî rûnişt û Yoaş li Samîriyê
tevî qiralên Îsraêlê hate binax kirin.

*Mirina Elîşa*

14 Û Elîşa nexweş ket û dê bi vê
nexweşiyê bimira û qiralê Îsraêlê
Yoaş daket cem wî û li ser wecê wî
giriya û got: Bavo, ya bavo! Ereba
Îsraêlê û siwarên wî! 15 Û Elîşa jê
re got: Kevanekê û tîran rahêje. Û
ji xwe re kevanekê û tîran rahişt.
16 Û ji qiralê Îsraêlê re got: Des-
tê xwe deyne ser kevanê û destê
xwe danî. Û Elîşa destên xwe danî
ser destên qiral. 17 Û got: Şivaka
li aliyê rojhilatê veke û vekir. Û
Elîşa: Tîrê bavêje! û avêt. Û got:
Tîra XUDAN ya xelasiyê, li dijî
Sûriyê tîra xelasiyê ye! ji ber, heta
ku tu Sûriyeyiyan biqedînî tuyê li
Afekê li wan bixe. 18 Û got: Tîran
rahêle û rahişt. Û ji qiralê Îsraêlê
re got: Li erdê bixe! û sê carî li
erdê xist. 19 Û zilamê Xwedê li
dijî wî hêrs bû û got: Divê te pênc

an jî şeş carî lê bixista; wê gavê
heta ku te Sûriyê biqedanda te yê
li wan bixista; lê belê niha tuyê sê
carî li Sûriyê bixe.
20 Û Elîşa mir û wî binax kirin. Û
nijdeyên Moabê di seriyên salan
de êrîşî welat dikirin. 21 Û wusa
bû ku, dema zilam binax dikirin,
a vay, nijdeyekê dîtin û wî zilamî
avêtin gora Elîşa û dema zilam
ket û bi hestiyên Elîşa ket, vejiya
û li ser pêlên xwe rabû.
22 Û di hemû rojên Yehoahaz de,
qiralê Sûriyê Hazael zorê da Îs-
raêlê. 23 Lê belê XUDAN, ji ber
peymana xwe ya ku bi Birahîm, Îs-
haq û Aqûp re daniye, xêrê bi wan
re kir û heyfa wî li wan hat û berî
da wan û nexwest ku wan helaq
bike û heta niha wan ji ber wecê
xwe ve neavêt. 24 Û qiralê Sûriyê
Hazael mir û li dêvila wî, lawê wî
Ben-Hadad bû qiral. 25 Û bavê wî
ji destê Yehoahaz, bajarên ku Ha-
zael bi cengê girtibû, Yehoaşê lawê
Yehoahaz ji destê Ben-Hadadê
lawê Hazael stend. Yoaş sê carî li
wî xist û bajarên Îsraêlê şunda girt.

*Qiraletiya Amatsya ya Cihûdayê*
2.Dîr 25

14 Di du saliya qiralê Îsraêlê
Yoaşê lawê Yoahaz de,
Amatsyayê lawê Yoaşê qiralê
Cihûda bû qiral. 2 Dema bû qiral
bîst û pênc salî bû û li Orşelîmê bîst
û neh sal qiraletiyê kir û dayika wî
ji Orşelîmê bû û navê wê Yehoad-
dîn bû. 3 Ya ku di çavê XUDAN de
rast bû kir, lê belê ne mîna bapîrê
xwe Dawid bû; li gor her tiştê ku
bavê wî Yoaş kiriye çêkir. 4 Lê
cîhên bilind nehatin rakirin; netewe
hîn li cîhên bilind qurbanan serjê
dikirin û buxurê dişewitandin. 5 Û
wusa bû ku, dema qiraletî bi destê
wî ve hate zeximandin, li qûlên ku
bavê wî qiral xistine, xist[1]; 6 lê belê
mîna di pirtûka zagonê ya Mûsa
de nivîsandiye, zarokên mêrkujan
nekuşt, çawa ku XUDAN bi gotina:
Dê bav, bona zarokên xwe neyên
kuştin û law jî bona bavên xwe
neyên kuştin; tenê dê her kes bona
sûcên xwe bên kuştin emir daye.
7 Li Edomê, di newala Xwê de,
wî li deh hezar kesî xist û bi cengê
Sela bi dest ve xist û navê Yoktêelê
lê kir, heta îro jî wusa ye.
8 Wê gavê Amatsya, ji qiralê Îs-
raêlê Yehoaşê lawê Yehoahazê,
lawê Yehû re, bi gotinan: Were,
em rû bi rû hev bibînin! şandiyan
şand. 9 Û qiralê Îsraêlê Yehoaş, ji
qiralê Cihûdayê Amatsya re şand û
got: Kelemiya ku li Lubnanê ye, ji
darê erzê ê ku li Lubnanê ye şand
û got: Qîza xwe bi jinitî bide lawê
min! û heywanekî beyarê ê ku li
Lubnanê bû, derbas bû kelemiyê di
bin lingên xwe de eciqand. 10 Te
bitûnî li Edomê xist û dilê te, te bi-

1 Kuştin.

lind kir; bi vê yekê pesnê xwe bide
û di mala xwe de rûne! Ma çima tu,
bona ku tevî Cihûda bikeve, xwe
davêje asîwê?
11 Lê belê Amatsya guhdarî ne-
kir. Û qiralê Îsraêlê Yehoaş derket
û ew û qiralê Cihûda Amatsya,
li bajarê Beyt-Şemeşa Cihûstanê
rû bi rû hev dîtin. 12 Û Cihûda li
ber Îsraêlê xera bû û her kes revi-
yan çadirên xwe. 13 Û qiralê Îs-
raêlê Yehoaş, lawê Ahazya, lawê
Yehoaş li Beyt-Şemeşê bi qiralê
Cihûdayê Amatsya girt û ket
Orşelîmê û ji deriyê Efrayîm, heta
deriyê qozîkê, qasî çar sed gezî[1]
dîwarê Orşelîmê xera kir. 14 Û
hemû zêr û zîv û hemû feraxên li
mala XUDAN û di xezîneya mala
qiral de ne û bi hêsîrtî jî zilaman
girtin û vegeriya Samîriyê.
15 Û karên Yehoaş ên li şûnda mane
û hêza wî û ka çawa bi Amatsyayê
qiralê Cihûstanê re ceng kiriye, ma
gişt di Pirtûka Dîrokan ya qiralên
Îsraêlê de ne nivîsandîne? 16 Û
Yehoaş tevî bapîrên xwe raket û
li Samîriyê, li cem qiralên Îsraêlê
hate binax kirin û li dêvila wî, lawê
wî Yeroboam bû qiral.

*Mirina Amatsyayê Qiralê Cihûdayê*

17 Û Amatsyayê lawê Yoaşê qi-
ralê Cihûda, paşî mirina Yehoaşê
lawê Yehoahazê qiralê Îsraêlê
panzdeh sal jiyana xwe domand.
18 Û karên Amatsya ên li şûnda
mane ma di Pirtûka Dîrokan ya
qiralên Cihûdaêyê de ne nivîsan-
dîne? 19 Û li Orşelîmê li dijî wî
dek û dolav danîn û reviya Lakîşê
û li pêy wî şandin Lakîşê û li wir
wî kuştin. 20 Û wî li ser hespan
anîn û li Orşelîmê, di bajarê Da-
wid de li cem bapîrên xwe hate
binax kirin. 21 Û hemûya netewa
Cihûda, Azarya rahiştin û ew bi
xwe şanzdeh salî bû û li dêvila
bavê wî Amatsya, wî kirin qiral.
22 Bajarê Elatê ava kir û paşî ku
bavê wî tevî bapîrên xwe yî qiral
raket wî vegerand Cihûdayê.

*Qiraletiya Yeroboamê Duwem ya li Ser Îsraêlê*

23 Di panzdeh saliya qiralê Cihû-
da Amatsyayê lawê Yoaş de, Yero-
boamê lawê Yoaşê qiralê Îsraêlê,
li Samîriyê bû qiral û çel û yek sal
qiraletiyê kir. 24 Û yê ku di çavên
XUDAN de xerab e kir, ji hemû
sûcên ku Yeroboamê lawê Nebat,
bi Îsraêlê ve dayiye kirin neqeti-
ya. 25 Li gor gotina Xwedayê Îs-
raêlê XUDAN, bi navdîtiya qûlê
xwe peyxamber Yûnisê ku lawê
Amîttayê Gar-Heferî ye gotibû,
ji cîhê ketina Hamatê, heta behra
Arabayê[2] ê ku heta sînora Îsraêlê
stendiye ev e. 26 Ji ber ku XU-

[1] Li rasteka menan binêrin.

[2] Newala kûr ya li bakur û başûrê behra Lûtê ye.

DAN ketina Îsraêlê ya ku gellekî
bi jan e dît; dixwaze bila dîl be,
an jî azad be, tu kes nemabû û
kesî ku alîkariyê bi Îsraêlê re bike
tune bû. 27 Û XUDAN: Ez ê navê
Îsraêlê ji bin ezmanan ve paqij
bikim, negot û wan bi destê Yero-
boamê lawê Yoaş ve xelas kir.
28 Û karên Yeroboam ên li şunda
mayîne û her tiştên ku kirine û
hêza wî û ka çawa cengê kiriye û
çawa şunda stendina Şamê û Ha-
mataya Cihûda ji Îsraêlê re sten-
diye, ma di pirtûka Dîrokan ya
qiralên Îsraêlê de ne nivîsandî ye?
29 Û Yeroboam tevî bapîrên xwe,
bi qiralên Îsraêlê re raket û li dê-
vila wî lawê wî Zekerya bû qiral.

*Qiraletiya Azarya ya Cihûdayê*

15 Di bîst û heft saliya Yero-
boamê qiralê Îsraêlê de,
Azaryayê lawê qiralê Cihûdayê
Amatsya bû qiral. 2 Dema bû qiral,
şanzdeh salî bû û li Orşelîmê, pêncî
û du sal qiraletiyê kir û dayika wî
ji Orşelîmê bû û navê wê Yekolya
bû. 3 Li gor her tiştên ku bavê wî
Amatsya çêkiriye, tiştê ku di çavê
XUDAN de rast e çêkir. 4 Lê cîhên
bilind nehatin rakirin; netewe hîn
li cîhên bilind qurbanan jêdikirin û
buxurê dişewitandin. 5 Û XUDAN
li qiral xist û heta roja mirina xwe
bi cizam bû û di xaniyekî din de
rûdinişt. Û lawê qiral Yotam, ser-
weriyê ji netewa welêt re dikir û li
ser mala qiral bû. 6 Û karên Azarya
ên li şunda mayîne û her tiştên ku
kirine, a vay, ma di pirtûka Dîrokan
ya qiralên Cihûdayê de ne nivîsan-
dî ye? 7 Û Azarya tevî bapîrên xwe
raket û wî li cem bapîrê wî, di ba-
jarê Dawid de binax kirin û li dêvi-
la wî lawê wî Yotam bû qiral.

*Qiraletiya Zekerya ya Îsraêlê*

8 Û di sîh û heyşt saliya qiralê
Cihûda Azarya de, Zekeryayê lawê
Yeroboam, li Samîriyê şeş meh qi-
raletiyê li ser Îsraêlê kir. 9 Û mîna
ku bapîrên wî kirine, ya ku di çavê
XUDAN de xerab e kir; ji sûcên
ku Yeroboamê lawê Nebat bi Îs-
raêlê re dayiye kirin neqetiya. 10 Û
Şallûmê lawê Yabeş li dijî wî du-
zenê danî û li ber netewê li wî xist û
wî kuşt û li dêvila wî bû qiral. 11 Û
karên Zekerya ên li şunda mayîne,
a vay, di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Îsraêlê de nivîsandîne. 12 Gotina
ku XUDAN ji Yehû re: Dê lawên
te yên nifşeya te yî çaremîn li ser
texta Îsraêlê ve rûnin gotiye ev e.
Û wusa bû.

*Qiraletiya Şallûm ya Îsraêlê*

13 Di sîh û neh saliya qiralê Cihû-
da Ûzziya de Şallûmê lawê Yabeş
bû qiral û li Samîriyê, bêkêmasî
mehekê qiraletiyê kir. 14 Û Me-
nahemê lawê Gadî ji Tîrtsayê der-
ket û hate Samîriyê û li Samîriyê
li Şallûmê lawê Yabeş xist û wî

kuşt û li dêvila wî bû qiral. 15 Û
karên Şallûm ên li şunda mayîne
û dek û dolava ku daniye, a vay,
di pirtûka Dîrokan ya qiralên Îs-
raêlê de nivîsandî ye. 16 Wê gavê
Menahem Tîfsahê û hemûyên ku
li wir in û ji Tîrtsayê wê de, li
sînorên wê xistin; ji ber ku jê re
venekiribûn, bo vê yekê lê xist û
zikên hemû pîrekên ducanî yên li
wir in qelişand.

*Qiraletiya Menahem ya Îsraêlê*

17 Di sîh û neh saliya qiralê Cihû-
dayê Azarya de Menahemê lawê
Gadî li ser Îsraêlê bû qiral. Û li
Samîriyê deh sal qiraletiyê kir.
18 Û ya ku di çavê XUDAN de
xerab e kir, ji sûcên ku Yeroboamê
lawê Nebat bi Îsraêlê ve dayiye
kirin, di hemûya rojên xwe de ne-
qetiya. 19 Qiralê Asûrê Pûl, bi ser
welêt ve meşiya û bona ku qira-
letiyê bi destê xwe ve bizexmîne,
destê Pûl pê re be, Menahem deh
hezar talant zîv da wî.
20 Menahem bona ku vî zîvî bide
qiralê Asûrê, li ser Îsraêlê mîna
ku li serê zilamekî pêncî şekel zîv
be, li hemû zilamên xort û dewle-
mend ve bacê danî. Û qiralê Asûrê
şunda vegeriya û li wir, li welat ve
nesekinî. 21 Û karên Menahem
ên li şunda mayîne û her tiştên ku
kiriye, ma di pirtûka Dîrokan ya
qiralên Îsraêlê de ne nivîsandine?
22 Û Menahem tevî bapîrên xwe
raket û li dêvila wî lawê wî Pe-
kahya bû qiral.

*Qiraletiya Pekahya ya Îsraêlê*

23 Di pêncî saliya qiralê Cihû-
dayê Azarya de Pekahyayê lawê
Menahem li ser Îsraêlê bû qiral û
du sal qiraletiyê kir. 24 Û tiştê ku
di çavê XUDAN de xerab e kir; ji
sûcên ku Yeroboamê lawê Nebat
bi Îsraêlê ve dayiye kirin neqetiya.
25 Û cengewarê ereba wî bi xwe,
Pekahê lawê Remalya li dijî wî dek
û dolavê danî û li Samîriyê, di birca
mala qiral de, tevî Argop û Arye lê
xistin û ji lawên Gîlead, pêncî kes
bi wî re bûn û wî kuşt û li dêvila
wî bû qiral. 26 Û karên Pekahya
ên li şunda mayîne û her tiştên ku
kiriye, a vay, di pirtûka Dîrokan ya
qiralên Îsraêlê de nivîsandîne.

*Qiraletiya Pekah ya Îsraêlê*

27 Di pêncî û du saliya qiralê Cihû-
da Azarya de, Pekahê lawê Remal-
ya li Samîriyê, li ser Îsraêlê bû qiral
û bîst sal qiraletiyê kir. 28 Û yê ku
di çavê XUDAN de xerab e kir û
ji sûcên ku Yeroboamê lawê Nebat,
bi Îsraêlê ve dayîne kirin neqetiya.
29 Di rojên qiralê Îsraêlê Pekah
de, qiralê Asûrê Tîglat-Pîleser hat
û Iyonê û Abel-Beyt-Maakayê û
Yanoahê û Kedeşê û Hatsorê û
Gîleadê û Galîleyê û hemûya warê
Naftalî girt û wan berbi Asûrê ve
ajot. 30 Û Hoşeyayê lawê Ela li

dijî Pekahê lawê Remalya dek û
dolavê danî û lêxist û wî kuşt û
di bîst saliya Yotamê lawê Ûzzi-
ya de li dêvla wî bû qiral. 31 Û
karên Pekah ên li şunda mayîne û
her tiştên ku kiriye, a vay, ew di
pirtûka Dîrokan ya qiralên Îsraêlê
de nivîsandîne.

*Qiraletiya Yotam ya Cihûdayê*

2.Dîr 27

32 Di du saliya qiralê Îsraêlê Pe-
kahê lawê Remalya de, Yotamê la-
wê qiralê Cihûdayê Ûzziya bû
qiral. 33 Dema bû qiral, bîst û
pênc salî bû û li Orşelîmê şanzdeh
sal qiraletiyê kir û navê dayi-
ka wî Yerûşaya qîza Tsadok bû.
34 Û ya ku di çavê XUDAN de
rast e kir; li gor her tiştê ku bavê
wî Ûzziya kiriye kir. 35 Lê belê
cîhên bilind ranekir, netewe hîn
li cîhê bilind qurbanan jêdikirin
û buxurê dişewitandin. Deriyê
jorîn yê mala XUDAN wî çêkir.
36 Û karên Yotam ên li şunda
mayîne û her tiştên ku kiriye,
ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Cihûdayê de ne nivîsandîne?
37 Û XUDAN di wan rojan de
dest pêkir û Retsînê qiralê Sûri-
yê û Pekahê lawê Remalya li
dijî Cihûdayê şand. 38 Û Yotam
tevî bapîrên xwe raket û di ba-
jarê bapîrê xwe Dawid de, li cem
bapîrên xwe hate binax kirin û li
dêvila wî lawê wî Ahaz bû qiral.

*Qiraletiya Ahaz ya Cihûdayê*

2.Dîr 28

16 Di hivdeh saliya Pekahê
lawê Remalya de, Ahazê
lawê qiralê Cihûdayê Yotam bû qi-
ral. 2 Dema Ahaz bû qiral, bîst salî
bû û şanzdeh sal li Orşelîmê qira-
letiyê kir û Ahaz mîna ku bapîrê
wî Dawid ya di çavên Xwedayê
xwe XUDAN de rast e, nekir. 3 Û
di rêya qiralên Îsraêlê de meşiya û
li gor tiştên mekrûh ên netewên ku
XUDAN ji ber lawên Îsraêl wan
qewirandiye, lawê xwe ji agir ve
derbas kir. 4 Û li cîhên bilind û li
ser giran û di bin her darê hêşîn de
qurban jêkir û buxurê şewitand.
5 Wê gavê Retsînê qiralê Sûriyê û
qiralê Îsraêlê Pekahê lawê Remal-
ya bona cengê hilkişiyan Orşelîmê
û dorûber li ber Ahaz girtin, lê belê
hêz neanîn ku bi ser wî bikevin. 6
Di wê demê de Retsînê qiralê Sûri-
yê, Elat ji Sûriyê re şunda stend û
Cihûdan ji Elatê ve ajot û wan ji
wir derxist û Sûriyî ketin Elatê û
heta îroj li wir rûdinin.
7 Û Ahaz ji qiralê Asûrê Tîglat-
Pîleser re, bi gotina: Ez qûl û lawê
te me; were û min ji destê qiralê
Sûriyê û qiralê Îsraêlê ên ku li
dijî min serî hildane xelas bike!
şandiyan şand. 8 Û Ahaz zîv û
zêrê ku di mala XUDAN de û di
xezîneyên mala qiral de ne rahişt
û bi xelatî ji qiralê Asûrê re şand.
9 Û qiralê Asûrê wî guhdarî kir û

qiralê Asûrê li dijî Şamê derket û
wê girt û gelê wê berbi Kîrê ve
ajotin û Retsîn kuşt.
10 Û qiral Ahaz, bona pêrgîni-
ya qiralê Asûrê Tîglat-Pîleserê
bike, çû Şamê û pêşkêşîgeha ku
li Şamê ye dît û qiral, li gor hemû
karê pêşkêşîgehê mînaka wê û
şikilê wê ji kahîn Ûriya re şand.
11 Û kahîn Ûriya pêşkêşîgehekê
ava kir, li gor her tiştên ku qiral
Ahaz ji Şamê şandibû, kahîn
Ûriya heta ku qiral Ahaz ji Şamê
hat, wusa kir. 12 Û qiral ji Şamê
ve hat û qiral pêşkêşîgehê dît û
qiral nêzîkî pêşkêşîgehê bû û li
ser wê pêşkêşiyê pêşkêş kir. 13
Û pêşkêşiya xwe ya şewitandinê
û pêşkêşiya nan şewitand û
pêşkêşiya xwe ya rijandinê ri-
jand û xwîna pêşkêşiya xweşiyê
bi ser pêşkêşîgehê ve reşand. 14
Û pêşkêşîgeha tûncî ya li ber
XUDAN e, ji ber malê, ji nav-
bera pêşkêşîgeha xwe û mala
XUDAN ve anî û wê danî ba-
kurê pêşkêşîgeha xwe. 15 Û
qiral Ahaz emir da kahîn Ûriya
û got: Pêşkêşiya şewitandinê
ya sibehê û pêşkêşiya nan ya
êvarê û pêşkêşiya şewitandinê
ya qiral û tevî pêşkêşiya wî ya
nan, pêşkêşiya şewitandinê ya
hemûya netewa welêt û pêşkê-
şiya nan ya wan û pêşkêşiya ri-
jandinê ya wan li ser pêşkêşîgeha
mezin ve bişewitîne û hemûya
xwîna pêşkêşiya şewitandinê û
hemûya xwîna qurbanê li ser wê
bireşîne; lê belê dê pêşkêşîgeha
tûnc, bona pirsê ya min be. 16 Û
kahîn Ûriya, li gor her tiştê ku
qiral Ahaz emir daye kir.
17 Û qiral Ahaz, lewhên kêleka
lingdankạn jê kir û leganê ji ser
wan rakir û behrê, ji ser ganêrên
ku di bin wê de ne daxist û wê danî
ser raxêreke kevir. 18 Û rêya girtî
ya bona roja Sebtê li malê çêkirine
û cîhê ku dê qiral ji derve bikeve
hundir, ji ber qiralê Asûrê, berê wan
dan mala XUDAN. 19 Û karên ku
ji ber kirinên Ahaz li şunda mayî-
ne, ma di pirtûka Dîrokan ya qi-
ralên Cihûdayê de ne nivîsandîne?
20 Û Ahaz tevî bapîrên xwe raket
û li bajarê Dawid, li cem bapîrên
xwe hate binax kirin û li dêvila wî
lawê wî Hîzkiya bû qiral.

*Hoşeya, Qiralê Îsraêlê yê dawîn*

17 Û di donzdeh saliya qi-
ralê Cihûdayê Ahaz de,
Hoşeyayê lawê Ela, li Samîriyê,
li ser Îsraêlê bû qiral û neh sal
qiraletiyê kir. 2 Û ya ku di çavê
XUDAN de xerab e kir, lê ne
mîna qiralên Îsraêlê ên berî wî ne
bû. 3 Qiralê Asûrê Şalmaneser li
dijî wî rabû; Hoşeya jê re bû qûl
û bacê da wî. 4 Û qiralê Asûrê, di
Hoşeya de xayîntiyê dît; ji ber ku
ji qiralê Misirê Soy re şandiyan
şandibû û mîna ku ji salê heta

salê dişand, ji qiralê Asûrê re
bacê neşand û qiralê Asûrê wî girt
û di girtîgehê de wî girê da. 5 Û
qiralê Asûrê derket hemûya welêt
û hate Samîriyê û sê sal dor û ber
lê girt. 6 Di sala nehan ya Hoşeya
de qiralê Asûrê Samîriyê bi dest
ve xist û Îsraêlê berbi Asûrê ve
ajot û wan di Halahê de û di Ha-
bora ku li ber çemê Gozanê de ye
û di bajarên Medan de bi cîh kir.
7 Û wusa bû, ji ber ku lawên Îsraêl
li dijî XUDAN Xwedayê xwe yê
ku wan ji bin destê qiralê Misirê
Fîrawûn, ji warê Misirê ve derxis-
tîbû, sûc kiribûn û ji îlahên wekî din
ve tirsiyabûn 8 û di zagonên nete-
wên ku XUDAN wan ji ber lawên
Îsraêl ve qewirandibûn de û di za-
gonên ku qiralên Îsraêlê çêkirine
de meşiyabûn. 9 Û lawên Îsraêl,
karên ku li dijî XUDAN Xwedayê
wan ne rast in, bi dizîka çêkirin û di
hemûyên bajarên xwe de, ji qûleya
notirvanan heta bajarê bi dîwar, ji
xwe re cîhên bilind çêkirin 10 û li
ser her girî û di bin her darê hêşîn de
bona xwe kevirên çikandî û Aşeran
çikandin 11 û mîna netewên ku
XUDAN ji ber wan qewirandine
dikin, li wir di hemû cîhên bilind de
buxuran şewitandin û bona ku XU-
DAN hêrs bikin, tiştên xerab çêki-
rin. 12 Û ji pûtan re qûlitiyê kirin û
bona vana XUDAN ji wan re: Hûn
ê vî tiştî nekin! gotibû. 13 Û XU-
DAN ji Îsraêlê re û ji Cihûdayê re,
bi gotina: Ji van rêyên xwe yî xerab
vegerin, li gor hemûya zagona ku ji
bapîrên we re emir kirime û bi des-
tê qûlên xwe peyxamberan ji we
re şandime; bi zagon û emirên min
ve bigirin! bi navdîtiya hemû pey-
xamberan û hemûyên ku Dibînin
şahdeyiyê kiribû. 14 Lê belê guh-
darî nekirin, lê histuyên xwe, mîna
histuyên bapîrên xwe, ên ku ji
XUDAN Xwedayê xwe baweriyê
neanîne, hişk kirin. 15 Û zagonên
wî û peymana ku bi bapîrên wan
re kiriye û şahdeyiyên ku ji wan
re kiriye biçûk dîtin û li pêy tiştê
vala meşiyan û bûn zilamên vala û
çawa ku XÚDAN, bona ku mîna
neteweyên ku li dora xwe ne nekin
emir dabû, ew li pêy wan meşiyan.
16 Û dev ji hemû emirên XUDAN
Xwedayê xwe berdan û ji xwe re
pûtên rijandî, du heb golik çêki-
rin û Aşerayekê çêkirin û ji hemû
artêşa ezmanan re peristinê kirin û
ji Baal re qûlitiyê kirin. 17 Û law û
qîzên xwe ji agir ve derbas kirin û
remildariyê kirin û sêrbaziyê kirin
û bona ku yê di çavê XUDAN de
xerab e bikin, wî hêrs bikin xwe
firotin. 18 Û XUDAN, li dijî Îs-
raêlê zehf hêrs bû û wan ji ber çavê
xwe rakirin, lê tenê xeynî nîjada
Cihûda, tu kes nema.
19 Cihûda jî bi emirên XU-
DAN Xwedayê xwe ve negirt û
di zagonên ku Îsraêl çêkirine de
meşiyan. 20 Û heta ku wan ji ber

xwe avêtin, XUDAN hemûya nî-
jada Îsraêlê biçûk dît û wan nizm
kir û da destê talankiran. 21 Ji ber
ku Îsraêlê ji mala Dawid çirandin
û cuda kirin û Yeroboamê lawê
Nebat kirin qiral û Yeroboam Îs-
raêlê ji pêy XUDAN çewt kirin û
sûcê mezin bi wan ve da kirin.
22 Û lawên Îsraêl, di hemû
sûcên ku Yeroboam dide kirin de
meşiyan. 23 XUDAN, mîna ku bi
navdîtiya hemû qûlên xwe pey-
xamberan gotibû, heta ku Îsraêlê
ji ber çavê xwe rake, ji wan sûcên
xwe neqetiyan. Û Îsraêl ji erdê
xwe ve, berbi Asûrê hate ajotin,
heta îroj wusa ye.
24 Û qiralê Asûrê ji Babîlê û ji
Kûtayê û ji Avvayê û ji Hamat
û Sefarvaîmê zilaman anî û wan
di bajarên Samîriyê de, li cîhên
lawên Îsraêl de bi cîh kir û Samîri-
yê ji xwe re kirin milk û di bajarên
wê de rûniştin. 25 Û wusa bû ku,
di destpêka li wir bicîhbûna wan
de ji XUDAN neditirsiyan û XU-
DAN şêran şand nav wan û ji nav
wan hinek zilaman kuşt. 26 Û bi
qiralê Asûrê re axifîn û jê re go-
tin: Neteweyên ku te wan ajot û di
bajarên Samîriyê de bi cîh kir, bi
ûsila îlahê welêt nizanin û şêran
şandin navbera wan û a vay, wan
dukujin ji ber ku bi ûsila îlahê
welêt ve nizanin.
27 Û qiralê Asûrê emir da û got:
Kahînekî ji kahînên ku we ajotin
wir bibin wir û bila herin û li wir
rûnin û ûsila îlahê welat hînî wan
bike. 28 Û kahînek ji kahînên ku ji
Samîriyê ajotibûn hat û li Beytelê
rûnişt û ka wê çawa ji XUDAN ve
bitirsin, hînî wan dikir. 29 Lê belê
her netewe îlahên xwe çêdikirin
û her netewe wan danîn bajarên
ku tê de rûdiniştin, xaniyên cîhên
bilind, yên ku Samîriyiyan ava ki-
ribûn. 30 Û zilamên Babîlê Sûkot-
Benotê çêkirin û zilamên Kûtê,
Nergalê çêkirin û zilamên Hamatê
Aşîmayê çêkirin 31 û Avvayiyan
Nîbhaz û Tartakê çêkirin û Se-
farvaîmiyan lawên xwe, ji îlahên
Sefarvaîmê, ji Adrammelekê û
Anammelekê re şewitandin. 32 Û
aliyekî ji XUDAN ditirsiyan û ali-
yê din jî ji xwe re ji nav hemûya
gel kahînên cîhên bilind çêdikirin
û vana, di xaniyên cîhên bilind de
ji bo wan qurbanan serjê dikirin.
33 Ji XUDAN ve ditirsiyan û ji
îlahên xwe re, mîna ûsila netewe-
yên ku ji nav wan ve hatine ajotin,
qûlitiyê dikirin.
34 Ew, heta îroj mîna ûsila berê di-
kin, ji XUDAN ve natirsin û ên ku
ji lawên Aqûp ku wî navê Îsraêl lê
kiriye, mîna zagonên ku XUDAN
emir kiriye û li gor dadgehê û li gor
emir nakin. 35 XUDAN bi lawên
Aqûp re peymanê danîbû û ji wan
re emir kiribû û gotibû: Divê hûn ji
îlahên wekî din metirsin û peristinê
ji wan re nekin û ji wan re qûlitiyê

nekin û ji wan re qurbanan serjê
nekin; 36 lê belê divê hûn ji XU-
DANê ku bi qudreta xwe yî mezin
û bazûya xwe yî dirêjbûyî we ji
warê Misirê ve derxistiye bitirsin;
divê hûn ji wî re peristinê bikin û
qurbanan ji wî re serjê bikin 37 û
bona ku hûn zagon û darazî û şerîet
û emirên ku bona we nivîsandine,
bînin cîh; di hemûya rojan de hûn
ê bi wan bigirin û ji îlahên wekî
din metirsin 38 û divê peyma-
na ku bi we re danîme ji bîr me-
kin û ji îlahên wekî din metirsin;
39 lê divê hûn ji Xwedayê xwe
XUDAN bitirsin û dê ew we ji des-
tê hemû neyarên we xelas bike.
40 Lê belê guhdarî nekirin, lê li gor
ûsila xwe çêkirin. 41 Û ev netewe
ji XUDAN ve ditirsiyan û ji pûtên
xwe yî qewartî re qûlitiyê dikirin
û bapîrên wan çawa kiribin, lawên
wan, lawên lawên wan jî heta îroj
wusa dikin.

*Qiraletiya Hîzkiya ya Cihûdayê*

2.Dîr 29-31

18 Û wusa bû ku, di sala
sêwemîn ya Hoşeyayê
lawê qiralê Îsraêlê Ela de, Hîzki-
yayê lawê qiralê Cihûdayê Ahaz
bû qiral. 2 Gava bû qiral, bîst û
pênc salî bû û li Orşelîmê bîst û
neh sal qiraltî kir û navê dayika
wî Abiya qîza Zekerya bû. 3 Û li
gor her tiştên ku bapîrê wî Dawid
kiriye, yê ku di çavê XUDAN de
rast e kir. 4 Cîhên bilind rakir û
kevirên çikandî şikandin û Aşera
jêkir û marê tûnc, yê ku Mûsa çê-
kiribû perçe kir, ji ber ku lawên Îs-
raêl, di wan rojan de jê re buxurê
dişewitandin û navê Nehûştan[1]
dabûn wî. 5 Bi Xwedayê Îsraêlê
XUDAN re ewle bû û di nav
hemû qiralên Cihûda ên li pêy wî
ne de û di nav yên ku berî wî ne
de yekî mîna wî tune bû. 6 Ji ber
ku xwe bi XUDAN ve girê da û
bi emirên ku XUDAN wan dane
Mûsa, girt. 7 Û XUDAN bi wî
re bû; her derket ku derê karê wî
qenc çû û li dijî qiralê Asûrê rabû
û jê re qûlitiyê nekir. 8 Heta Ga-
zayê û heta sînorên wê, ji qûleya
notirvanan heta bajarê bi dîwar li
Filistiyan xist.

9 Û wusa bû ku, di sala çaremîn ya
qiral Hîzkiya de, ku sala heftemîn
ya Hoşeyayê lawê Elayê qiralê Îs-
raêlê, qiralê Asûrê Şalmaneser, li
dijî Samîriyê derket û dor û berên
wê girt. 10 Û paşî sê salî wê gir-
tin; di sala şeşemîn ya Hîzkiya
de, ku ev sala nehemîn ya qiralê
Îsraêlê Hoşeya bû, Samîriye hate
stendin. 11 Û qiralê Asûrê, Îsraêlê
ber bi Asûrê ve ajot û wan danîn
Halahê û Habora ku çemê Gozanê
ye û bajarên Medan, 12 ji ber ku
gotina Xwedayê xwe XUDAN
guhdarî nekirin û ji peymana wî,

---

1 Parîkê tûncê.

ji hemû emirên ku qûlê XUDAN Mûsa kiriye wêdetir derbas bûn û guh nedan û nekirin.

*Gefên Sanherîb*

2.Dîr 32,1-23; Îşa 36

13 Û di sala çardehan ya qiral Hîzkiya de, qiralê Asûrê Sanherîb li dijî hemû bajarên Cihûda ên bi dîwar rabû û wan girt. 14 Û Hîzkiyayê qiralê Cihûdayê, ji bajarê Lakîşê, ji qiralê Asûrê re şand û got: Min bi xwe sûc kir, ji ser min vegere; tiştê ku tuyê li ser min bar bikî, ez ê bikişînim. Û qiralê Asûrê, sê sed talant zîv û sîh talant zêr danî li ser Hîzkiyayê qiralê Cihûdayê. 15 Û Hîzkiya, hemû zîvên ku li mala XUDAN in û yên li mala qiral in da. 16 Wê gavê Hîzkiya, zêrên ku qiralê Cihûda Hîzkiya pê deriyê Perestgeha XUDAN û sitûnên wê nuxumandibû[1] qeşart û wê da qiralê Asûrê. 17 Û qiralê Asûrê Tartan û Rabsarîs û Rabşake, bi gellek leşkerî ji Lakîşê şandin Orşelîmê, cem qiral Hîzkiya. Û derketin û hatin Orşelîmê û gava derketin, li cem rêka avê ya burka jorîn ya di sûka zeviya çirpînvan de ye sekinîn. 18 Û bangî qiral kirin û Elyakîmê lawê Hîlkiya û Şebnayê katib[2] û bûyernivîs Yoahê lawê Asaf, ên ku li ser mala qiral bûn derketin cem wan.

19 Û Rabşake ji wan re got: Niha ji Hîzkiya re bibêjin: Qiralê mezin, qiralê Asûrê wusa dibêje: Ev ewlebûna ku di te de yî çî ye? 20 Tu dibêje: Bona cengê şîret û quwet heye, lê belê vana gotinên lêva ne. Gelo niha tu bi kî ewle dibe û li dijî min radibe? 21 Niha, a vay, tu ji vî qamirê şikestî, heta çoyê bi Misirê ve ewle dibe û ger kî xwe bide ser, dê bi destê wî ve here û wî qul bike; Fîrawûnê qiralê Misirê, bo hemûyên ku pê ewle ne wusa ye. 22 Û ger hûn ji min re: Em bi Xwedayê xwe XUDAN re ewle dibin! bibêjin; îlahê ku Hîzkiya, bi gotina: Hûn ê li ber vê pêşkêşîgehê, di Orşelîmê de peristinê bikin, ji Cihûda û Orşelîmê re gotibû û cîhên wê yên bilind û perestgehên wê xera kiribû, ma ne ew e? 23 Û niha, haydê, bi efendiyê min qiralê Asûrê re miçilgê bigire û ger tu ji aliyê xwe, bikaribe siwaran li ser bike, ez du hezar hespî bidim te. 24 Wê çaxê ger wusa be, ma tu çawa dikarî ji herî biçûk qûlên efendiyê min, wecê karmendekî şunda vegerîne û bona erebeyên cengê û hespan, bi Misirê ve ewle bibe? 25 Ma niha, gelo bêyî emir dayîna XUDAN, bona xera kirina vê derê ez li dijî wî rabûm? XUDAN ji min re: Li dijî vî warî derkeve û wê xera bike! got.

[1] Dorûberên wan pê girtibûn.

[2] Nivîsyar.

26 Û Elyakîmê lawê Hîlkiya û
Şebna û Yoah ji Rabşake re gotin:
Em rica dikin, bi zimanê Aramî
ji van qûlên xwe re bibêje, ji ber
ku em ji wê fêhm dikin û dema
netewa ku li ser dîwêr bibihîze,
bi zimanê Cihûdî ji me re nebêje.
27 Û Rabşake ji wan re got: Gelo
bona ku ez van gotinan bibêjim
efendiyê min, min ji efendiyê te
û ji te re şand? Ma ji van zilamên
ku li ser dîwaran rûniştine û dê
tevî we pîsitiyên xwe bixwin û
mîzên xwe vexwin neşandiye?
28 Û Rabşake sekinî û bi Cihûdî,
bi dengekî bilind qêriya û axifî û
got: Gotina qiralê mezin, qiralê
Asûrê bibihîzin! 29 Qiral wusa
dibêje: Bila Hîzkiya we nexapîne;
ji ber ku dê hêza wî têra xelas ki-
rina we ji destên wî neke 30 û bila
Hîzkiya bi gotina: Dê muheqeq
XUDAN me xelas bike û dê ev ba-
jar neyê dayîn destê qiralê Asûrê,
we bi XUDAN re nede ewle ki-
rin! 31 Hîzkiya guhdarî mekin; ji
ber ku qiralê Asûrê wusa dibêje:
Bi min re aşitiyê bikin û ji min re
derkevin derve 32 û bona ku hûn
nemirin û sax bimînin, heta ku ez
werim û we bibim welatê genim û
xemra teze, welatekî nan û rezan,
welatê zeyt û hungivê û welatekî
mîna welatê we, bila her kes ji
mêwa xwe û ji darê xwe yî hêjîrê
bixwin û bila her kes ava sarinca
xwe vexwin û gava Hîzkiya we
bi gotina: Dê XUDAN me xelas
bike! bixapîne, guhdarî nekin!
33 Ma îlahên netewan yek jî xwe
ji destê qiralê Asûrê xelas kirine?
34 Îlahên Hamat û Arpadê li ku
derê ne? Îlahên Sefarvaîm, Hena
û Îvva li ku derê ne? Ma Samîriyê
ji destê min ve xelas kirin? 35 Ji
nava hemû îlahên welatan, ê ku
welatên xwe ji destê min ve xelas
kirine kî ne ku, XUDAN Orşelîmê
ji destê min ve xelas bike?
36 Û netewe bêdeng ma û tenê
gotinekê jî bersivê nedan wî; ji
ber ku emrê qiral ev bû: Bersivê
nedin wî! gotibû. 37 Û Elyakîmê
lawê Hîlkiyayê ku li ser mala qi-
ral bû û katib Şebna û bûyernivîs
Yoahê lawê Asaf, mîna ku kincên
wan hatine çirandin hatin cem
Hîzkiya û gotinên Rabşake jê re
gîhandin.

*Hîzkiya serî li Îşaya dide*

2.Dîr 32,20-23; Îşa 37,1-13

19 Û wusa bû ku, dema qi-
ral Hîzkiya vê yekê bihîst,
kincê xwe çirand û cilikê[1] li xwe
gerand û ket mala XUDAN. 2 Û
Elyakîmê ku li ser mala qiral bû û
katib Şebna û kalepîrên kahînan,
wekî ku cilikan li xwe gerandibin,
ji peyxamber Îşayayê lawê Amots
re şandin. 3 Û jê re gotin: Hîzki-
ya wusa dibêje: Îroj roja tengasî

*1* Yanê çûl.

û pekandin û ruswayiyê ye; ji ber
ku zarok hatin dema welidandinê,
lê belê hêza ku biwelidîne nîne.
4 Dibe ku Xwedayê te jî gotinên
Rabşakeyê bona ji XUDANê ku
zindî ye re, qadê bixwaze, efendi-
yê wî qiralê Asûrê wî şandiye, bi-
bihîze û wan gotinên ku Xwedayê
te XUDAN bihîstiye bi ceza bike;
bo vê yekê, bona yên li pêy mane
dua bike! 5 Û qûlên qiral Hîzkiya
hatin cem Îşaya. 6 Û Îşaya ji wan
re got: Hûn ê bi vî awayî ji efendi-
yê xwe re bibêjin: XUDAN wusa
dibêje: Ji ber gotinên ku xulamên
qiralê Asûrê, bona ku xeberan ji
min re bidin gotine û min jî wan
bihîstine metirse! 7 A vay, ez ê
ruhekî têxim hundirê wî û dê aga-
hiyekê bibihîze û vegere welatê
xwe û ez ê di welatê wî de, wî bi
şûr bixînim.
8 Û Rabşake vegeriya û dît ku
qiralê Asûrê, li dijî Lîbnayê di
cengê de ye; ji ber bihîstibû ku ji
Lakîşê koç kiriye. 9 Û bona qiralê
Habeşê Tîrhaqa, gotina: A vay,
bona ku li dijî te cengê bike der-
ket bihîst û dîsa şandiyan ji Hîz-
kiya re şand û got: 10 Hûn ê bi qi-
ralê Cihûdayê Hîzkiya re biaxifin
û wusa bibêjin: Bila Xwedayê te,
ê ku tu pê ewle yî; bi gotina: Dê
Orşelîm neyê dayîn destê qiralê
Asûrê! te nexapîne. 11 A vay, te
jî bihîst ku, ka çawa qiralên Asûrê
hemûya welatan bitûmî tune kiri-
ne û tiştên ku bi wan kirine û ma
qey tuyê xelas bibî? 12 Ma nete-
weyên ku bapîrên min wan tune
kirine, Gozan û Haran û Retsefê
û lawên Eden ên ku li Telassarê
ne, îlahên wan, wan xelas kirin?
13 Qiralê Hamatê, qiralê Arpadê,
qiralên bajarê Sefarvaîm, Hena û
Îvva li ku derê ne?

*Duaya Hîzkiya û bersiva Xudan*

Îşa 37,14-38; 2.Dîr 32,20-21

14 Û Hîzkiya nameyê ji destê
şandiyan stend û wê xwend û
hilkişiya mala XUDAN û Hîzkiya
wê li ber XUDAN raxist. 15 Û Hîz-
kiya li ber XUDAN lava kir û got:
Ya XUDAN Xwedayê Îsraêlê, ê
ku li ser kerûbiyan rûniştiye, Xwe-
dayê hemû qiraletiyên dinê tu, tenê
tu yî; te ezmanan û erd afirand.
16 Ya XUDAN, guhê xwe xahr
bike û bibihîze! Ya XUDAN, çavê
xwe veke û bibîne! Û gotinên San-
herîb, bona ku qadê ji Xwedayê ku
zindî ye re, bixwaze şandiye bibihî-
ze! 17 Ya XUDAN; bi rastî qiralên
Asûrê; netewe û welatên wan xera
kirin 18 û îlahên wan avêtin agir,
ji ber ku ew ne îlah bûn, lê karê
destê mirovan dar û kevir bûn; bo
vê yekê wan tune kirin. 19 Û niha,
ya XUDAN Xwedayê me, ez lava
dikim me ji destê wî xelas bike û
bila hemû qiraletiyên dinê bizani-
bin ku tu XUDAN, yê ku Xwedê
ye tenê tu yî!

*Gotinên Îşaya têne cîh*

20 Û Îşayayê lawê Amots ji Hîz-
kiya re şand û got: Xwedayê
Îsraêlê XUDAN wusa dibêje:
Lavaya ku te ji ber qiralê Asûrê
Sanherîb ji min re kir, bihîstim.
21 Gotina ku XUDAN di der-
heqê wî de gotiye ev e: Qîza Si-
yonê, qîza ku hîn neçûye mêr[1],
te biçûk dît û qerfê xwe bi te kir;
qîza Orşelîmê li pêy te serê xwe
hejand. 22 Ma te ji kî qadê xwest
û kufrê kir? Û te li dijî kî dengê
xwe bilind kir û çavên xwe ber bi
jor ve rakir? Li dijî Pîrozê Îsraêlê!
23 Te bi destê şandiyên xwe qadê
ji Xudan re xwest û got: Ez bi herî
ajaweya erebeyên xwe yên cengê
hilkişiyam girê çiyayan û cîhên
hundirîn, ên Lubnanê; ez ê darên
erzê ên bilind û darên serwî ên bi-
jartî jêbikim; li dêvila qesra herî
hundirîn, ez ê bikevim daristana
wî ya bexçê. 24 Min bîrê kola û
avên biyan vexwar û ez ê bi binya
lingên xwe hemû çemên Misirê
ziwa bikim.
25 Ma te nebihîstiye ku ji dema
dûr ve çawa wê kirime û ji rojên
kevin ve pêşniyara wê kirime?
Niha wê çêkirime ku, bila wêran
kirina bajarên bi dîwar bibe karê
te. 26 Ji ber vê yekê hêza kesên ku
di wan bajaran de rûdiniştin kêm
bû, ketin bêzarî û şermezariyê;
bûn mîna gîhayê çiyê û mîna
gîhayê hêşîn, mîna gîhayê ser xa-
niyan û bûn mîna zadê ku ba wê
şewitandiye. 27 Û ez bi rûniştina
te û ketin û derketina te û li dijî
min gurmîniya te dizanim. 28 Ji
ber ku tu li dijî min gurmiya û ji
ber ku kanciya te gîhaşt guhên
min, ez ê xeliqa xwe bi pozê te û
hevsara xwe bi devê te ve bixim
û ji rêya ku tu hatiye ez ê te ve-
gerînim!
29 Û dê ev ji te re bibe nîşan; hûn ê
vê sala, ya bi xwe derdikeve û sala
dudan ya ku ji wê derkeve bixwin
û di sala sêwemîn de biçînin û ra-
kin, rezan deynin û mêwên wan
bixwin. 30 Û yê ku ji mala Cihû-
da ye xelas bûye û ji ber maye, dê
ber bi jêrîn ve rehê berdin û ber bi
jorîn ve mêw bidin. 31 Ji ber ku
yên ji ber mayîne dê ji Orşelîmê,
ên xelas bûne dê ji çiyayê Siyonê
ve derkevin; dê xîreta XUDANê
artêşan vê yekê bike!
32 Bo vê yekê, ji ber qiralê Asûrê
XUDAN wusa dibêje: Dê neyê vî
bajarî û tîrê navêje wir û bi mer-
talê dernekeve hemberê wê û dê li
dijî wê meterîsê daneyne. 33 Dê ji
rêya ku hatiye ve vegere û dê neyê
vî bajarî, 34 ji ber ku bona xwe
û bona xatirê qûlê xwe Dawid,
bona ku xelas bikim, ez ê vî bajarî
biparêzim. XUDAN dibêje.
35 Û wê şevê wusa bû ku, milya-
ketê XUDAN derket û li artêşgeha

1 Nezewiciye, an jî: Bakîr.

Asûrê li sed û heyştê û pênc hezar
kesî xist û dema sibehê zilaman zû
rabûn, a vay, ew gişt laşên mirîne
bûn. 36 Û qiralê Asûrê Sanherîb
koç kir û çû û şunda vegeriya û
li Neynowayê rûnişt[1]. 37 Û wusa
bû ku, dema di mala îlahê xwe
Nîsrok de peristinê dikir, Adram-
melek û Şaretser bi şûr li wî xistin
û reviyan welatê Araratê. Û li dê-
vila wî lawê wî Esar-Haddon bû
qiral.

*Nexweşiya Hîzkiya*
2.Dîr 32,24; Îşa 38

20 Di wan rojan de Hîzkiya
di derica mirinê de nexweş
ket. Û lawê Amots peyxamber
Îşaya hat û jê re got: XUDAN
wusa dibêje: Ji mala xwe re we-
siyeta xwe bike; ji ber ku tuyê bi-
mire û nejî! 2 Û wî berê xwe da
dîwêr û li ber XUDAN geriya û
got: 3 Ax ya XUDAN! Ez lava di-
kim, ka di bîra xwe de bîne, çawa
bi rastiyê li ber te geriyam û ya
ku di çavê te de qenc e kirim! Û
Hîzkiya zehf giriya. 4 Lê belê berî
ku Îşaya ji hewşa navîn ya qesrê
ve derkeve, XUDAN jê re wusa
got: 5 Vegere û ji serokê netewa
min Hîzkiya re bibêje: Xwedayê
bapîrê te Dawid XUDAN wusa
dibêje: Duaya te bihîstim, hêstirên
çavên te dîtim; a vay, ez ê te qenc
bikim; tuyê di roja sêwemîn de
hilkişe mala XUDAN. 6 Û ez ê
panzdeh salî bi ser rojên te ve bi-
xim û ez ê te û vî bajarî ji nav lepê
qiralê Asûrê xelas bikim û ez ê vî
bajarî bona xwe û bona xatirê qûlê
xwe Dawid biparêzim. 7 Û Îşaya
got: Hêjîrê hişk rahêlin! Û rahiştin
û danîn ser pizikê û baş bû.
8 Û Hîzkiya ji Îşaya re got: Ka wê
nîşan çi be ku, dê XUDAN min
qenc bike û di roja sêwemîn de ez ê
hilkişim mala XUDAN? 9 Û Îşaya
got: Dê ji aliyê XUDAN ve ji te re
ev bibe nîşan, dê gotina ku gotiye
bike: Gelo sî bila deh derece ber
bi pêşiyê here an jî ber bi paşiyê
here? 10 Û Hîzkiya got: Bona siyê,
deh derece pêşîn çûyîn hêsan e; na,
tenê bi sî deh derece ber bi paşiyê
ve here. 11 Û peyxamber Îşaya ji
XUDAN re feryad kir û siya ku di
saeta Ahaz ya rojê de pêş ve çûye,
deh derece şunda anî.

*Bêaqiliya Hîzkiya*
Îşa 39; 2.Dîr 32,25-33

12 Di wê demê de Berodak-Bala-
danê lawê Baladanê qiralê Babîlê
bi nameyan xelatê ji Hîzkiya re
şandin; ji ber bihîstibû ku Hîzkiya
nexweş ketiye. 13 Û Hîzkiya wan
guhdarî kir û mala hemû tiştên bi-
qîmet, zîv û zêr û biharat û rûnê
biqîmet û mala çekan û her tiştên
ku di xezîneyên wî de ne nîşanî
wan dan. Di mal û welatê Hîzki-

[1] Bi cih bû.

ya de tiştekî ku nîşanî wan nedaye
nema. 14 Û peyxamber Îşaya hate
cem qiral Hîzkiya û jê re got: Van
zilamana gotin çi? Û ji ku ve hatin
cem te? Û Hîzkiya got: Ji welatê
dûr, ji Babîlê ve hatin. 15 Û got: Di
mala te de çi dîtin? Û Hîzkiya got:
Her tiştên ku di mala min de ne
dîtin; di xezîneyên min de tiştekî
ku nîşanî wan nedame nema.
16 Û Îşaya ji Hîzkiya re got: Go-
tina XUDAN guhdarî bike! 17 A
vay, dê roj werin ku, her tiştên ku
di mala te de ne û heçî tiştên ku
bapîrên te heta îroj dane hev, dê
bibin Babîlê; dê qet tiştek neyê
berdan, XUDAN dibêje. 18 Û dê
ji lawê te yên ji te derkevin û ji te
re biwelidin bigirin û dê ew ê di
qesra qiralê Babîlê de bibin yê xe-
sandî. 19 Û Hîzkiya ji Îşaya re got:
Gotina XUDAN, ya ku te got qenc
e. Û got: Ma ne wusa ye? Madem
ku dê di rojên min de ewlekarî û
xweşî hebe. 20 Û karên Hîzkiya
ên li pêy mane û hemûya hêza wî
û ka çawa burkê û rêya avê çêkiri-
ye û avê aniye bajêr, ma di pirtûka
Dîrokan ya qiralên Cihûda de ne
nivîsandîne? 21 Û Hîzkiya tevî
bapîrên xwe raket û li dêvila wî,
lawê wî Manaşşe bû qiral.

*Qiraletiya Manaşşe ya Cihûdayê*

2.Dîr 33,1-20; Yêr 15,4

21 Dema Manaşşe bû qi-
ral, donzdeh salî bû û li
Orşelîmê pêncî û pênc sal qirale-
tiyê kir û navê dayika wî Heftsîba
bû. 2 Û li gor tiştên mekrûh ên
neteweyên ku XUDAN wan ji
ber lawên Îsraêl ve qewirandibû,
ya ku di çavê XUDAN de xerab
e kir. 3 Û cîhên bilind ên ku bavê
wî Hîzkiya tune kiribû dîsa ava
kir û bona Baal pêşkêşîgehan danî
û mîna ku qiralê Îsraêlê Ahab çê-
kiriye Aşerayekê çêkir û bi artêşa
hemûya ezmanan ve peristinê kir
û ji wan re qûlitiyê kir. 4 Û di mala
XUDAN de, ya ku XUDAN: Ez ê
di Orşelîmê de navê xwe biximê
gotibû, pêşkêşîgehan çêkir. 5 Û
di her du h́ewşên mala XUDAN
de ji artêşa hemûya ezmanan ve
pêşkêşîgehan çêkir. 6 Û lawê xwe
ji agir ve derbas kir û sitêrnasî û
sêrbaziyê kir û cinvanan û nêrîn-
vanan xebitand; bona ku XUDAN
hêrs bike, di çavê wî de zehf xer-
abî kir. 7 Û pûtê Aşera ya qewartî,
ya çêkiribû danî wê mala ku, di
derheqê wê de XUDAN ji Dawid
re û ji lawê wî Silêman re gotibû:
Ez ê navê xwe bêdawî deynim vê
malê û Orşelîma ku ji hemû nî-
jadên Îsraêlê re bijarti me! 8 Ger
li gor her tiştê ku ji wan re emir
kirime û bona ku li gor hemûya
zagona ku qûlê min Mûsa ji wan
re emir kiriye, bi wan bigirin ez ê
lingên Îsraêlê, ji welatê ku dame
bapîrên wan, carekî din li der-
ve negerînim. 9 Lê belê guhdarî

nekirin û Manaşşe, bona ya hîn
jî zêde xerabtir e, neteweyên ku
XUDAN wan ji ber lawên Îsraêl
helaq kiriye, bike, wan ji rê ve
derxist.
10 Û XUDAN bi navdîtiya qûlên
xwe yên peyxamber axifî û got:
11 Madem ku qiralê Cihûda
Manaşşe van tiştên mekrûh çêki-
rin û ji her kirinên Amoriyên ku
berî wî ne, zêdetir xerabiyê kir û bi
pûtên xwe, bi Cihûda re jî sûcê da
kirin 12 û ji ber vê yekê XUDAN
Xwedayê Îsraêlê wusa dibêje: A
vay, ez bi ser Orşelîmê û Cihûda
ve xerabiyek wusa tînim ku, dê
her du guhên yên ku wê bibihîzin
biçîngin. 13 Û ez ê benê Samîriyê
yê pîvanê û şakula mala Ahab bi
ser Orşelîmê ve bişidînim û zila-
mek çawa sehanekê paqij dike,
paqij dike û li ser rû werdigerîne,
ez ê Orşelîmê jî wusa paqij bikim.
14 Û ez ê ya ku ji ber mêrasa min
mayî ye, bavêjim û ez ê wan bi-
dim destê neyarên wan û dê bona
hemû neyarên xwe bibin xenîmet
û malê talanê; 15 ji ber ku ya di
çavê min de xerab e kirin û ji
roja ku bapîrên wan ji Misirê ve
derketin, heta îrojê min bi hêrsê
ve xistin.
16 Û Manaşşe, xeynî kirina ya ku
di çavê XUDAN de xerab e û bi
Cihûda ve sûc dayîna kirinê, qasî
ji serîkî heta seriyê din hemûya
Orşelîmê dagire, zehf xwîna
bêsûc rijand. 17 Û karên Manaşşe
ên li pêy mane û her tiştên ku kiri-
ye û sûcê ku kiriye, ma di pirtûka
Dîrokan ya qiralên Cihûda de ne
nivîsandîne? 18 Û Manaşşe tevî
bapîrên xwe raket û di bexça mala
xwe de, di bexça Ûzza de hate bin-
ax kirin û li dêvila wî, lawê wî
Amon bû qiral.

*Qiraletiya Amon ya Cihûdayê*

2.Dîr 33,21-25

19 Dema Amon bû qiral, bîst û du
salî bû û li Orşelîmê du sal qirale-
tiyê kir û dayika wî qîza Harûtsê
Yotbayî bû û navê wê Meşûllemet
bû. 20 Û mîna ku bavê wî Manaşşe
kiriye, ya ku di çavê XUDAN de
xerab e kir. 21 Û di her rêya ku
bavê wî meşiyayî de meşiya û ji
pûtên ku bavê wî ji wan re qûliti-
yê kiriye re, qûlitiyê kir û ji wan
re peristinê kir 22 û dev ji Xwe-
dayê xwe XUDAN berda û di
rêya XUDAN de nemeşiya. 23 Û
qûlên Amon li dijî wî dek û dolavê
danîn û qiral di mala wî de kuştin.
24 Û netewa welêt li hemûyên
ku li dijî qiral Amon dek û dola-
vê danîne xistin û netewa welêt li
dêvila wî lawê wî Yoşiya kirin qi-
ral. 25 Û karên Amon ên li paşiyê
mane, ma di pirtûka Dîrokan ya
qiralên Cihûda de ne nivîsandîne?
26 Û di bexça Ûzza de, di gora
xwe de hate binax kirin û li dêvila
wî, lawê wî Yoşiya bû qiral.

*Qiraletiya Yoşiya ya Cihûdayê*

2.Dîr 34,1-13

22 Dema Yoşiya bû qiral,
heyşt salî bû û li Orşelîmê
sîh û yek sal qiraletiyê kir û dayi-
ka wî qîza Adayayê Botskatî bû
û navê wê Yedîda bû. 2 Û ya ku
di çavê XUDAN de rast e kir û di
her rêyên bapîrê xwe Dawid de
meşiya û bi rast û çepê ve çewt
nebû.
3 Û wusa bû ku, di sala hîjdeha
qiral Yoşiya de qiral, katib Şafanê
lawê Atsalyanê, lawê Meşûllam
şand mala XUDAN û got: 4 Hilkişe
cem kahîn Hîlkiya, bila zîvê ku no-
tirvanên şêmûgê ji netewê ve dane
hev û anîne mala XUDAN bijmêre
5 û bila wê bidin destên karkerên
ku dest bi karê mala XUDAN
kirine; bila ew jî zîvê bona sten-
dina onî û kevirên qewartî bidin
karkerên ku bona cîhên derizî ên
malê tamîr bikin li mala XUDAN
in, 6 xeratan û mîmaran û lêkiran,
ku bona selihandina xanî bistînin.
7 Lê hisabê perê ku dane destên
wan, bi wan re nehat dîtin ji ber ku
bi dilsoziyê dixebitîn.
8 Û kahînê mezin Hîlkiya ji ni-
vîskar Şafan re got: Di mala XU-
DAN de, pirtûka zagonê dîtim.
Û Hîlkiya pirtûkê da Şafan û wî
jî xwend. 9 Û nivîskar Şafan hate
cem qiral û agahiyê ji qiral re anî
û got: Qûlên te zîvê ku di malê de
bû, vala kirin û wê dan destê kar-
kerê ku dest bi karê XUDAN kiri-
ne. 10 Û nivîskar Şafan ji qiral re
gîhand û got: Kahîn Hîlkiya pir-
tûkekê da min. Û Şafan li ber qi-
ral rûnişt û wê xwend. 11 Û wusa
bû ku, dema qiral gotinên pirtûka
zagonê bihîst, kincê xwe çirand.
12 Û qiral ji kahîn Hîlkiya û Ahî-
kamê lawê Şafan û Akborê lawê
Mîkaya û nivîskar Şafan û qûlê
qiral Asaya re emir da û got:
13 Herin û di derheqê gotinên vê
pirtûka ku hatiye dîtin de, bona
min û bona netewê û bona hemûya
Cihûdayê ji XUDAN ve bipirsin;
ji ber ku xezeba XUDANê ku li
dijî me sor bûye mezin e, ji ber
ku bapîrên me gotinên vê pirtûkê
guhdarî nekirin û li gor nivîsên ji
bo me hatine nivîsandin nekirin.
14 Û kahîn Hîlkiya û Ahîkam û
Akbor û Şafan û Asaya, lawê Har-
hasê notirvanê kincan, lawê Tîk-
va, çûn cem pîreka Hûldaya ku
peyxambera jina Şallûm e û pîrek,
li Orşelîmê, di taxa duwemîn de
rûdinişt û pê re axifîn. 15 Û ji
wan re got: Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN, wusa dibêje: Ji zilamê ku
we şandiye cem min re bibêjin:
16 XUDAN wusa dibêje: A vay,
ez ê asîwê bînim ser vê derê û li
ser ên ku li vir dijîn e, mîna hemû
gotinên pirtûkê, yên ku qiralê
Cihûda xwendiye. 17 Madem ku
dev ji min berdan û bi hemû karên
destên xwe, bona ku min hêrs

bikin, ji îlahên wekî din re buxurê
şewitandin, dê li dijî vî cîhî xeze-
ba min pev bikeve û dê venemire.
18 Lê belê hûn ê ji qiralê Cihûda
ê ku bona hûn ji XUDAN ve bi-
pirsin we şandine re wusa bibêjin:
XUDAN Xwedayê Îsraêlê wusa
dibêje: Gava em li ser gotinên ku
te bihîstiye bisekinin, 19 madem
ku dilê te nerm bûye û te bi bihîs-
tina gotina min ya dê xerab e û bi
nalet be li ser kesên ku li vir rû-
dinin, te li ber XUDAN xwe nizm
kir û kincê xwe çirand û li ber min
giriya; min jî te bihîst, XUDAN
dibêje. 20 Ji ber vê yekê a vay,
ez ê te beşdarî bapîrên te bikim û
tuyê bi xweşiyê li gora xwe bête
danîn, dê çavên te asîwa ku ez ê
bi ser vê derê ve bînim, nebînin. Û
agahiyê ji qiral re anîn.

*Yoşiya Pûtperestiyê qedexe dike*
2.Dîr 34,29-33

23 Û qiral şand û hemû ka-
lepîrên Cihûda û Orşelîmê
li cem xwe civand. 2 Û qiral, tevî
wî hemû zilamên Cihûda û heçiyên
ku li Orşelîmê rûdinin û kahînan û
peyxamberan, ji biçûk heta mezin,
hemûya netewê hilkişiyan mala
XUDAN û hemû gotinên pirtûka
peymanê ya di mala XUDAN de
hatiye dîtin bi wan ve da bihîstin
û xwend. 3 Û qiral li cem sitûnê
sekinî û bona ku li pêy XUDAN
bimeşe û bona ku emirên wî û
şahdeyiyên wî û zagonên wî bi
hemûya dil û bi hemûya can ve bi-
gire û bona ku gotinên peymana ku
di vê pirtûkê de nivîsandîne bîne
cîh, li ber XUDAN peymanê danî
û hemûya netewê peymanê tesdîq
kirin.
4 Û qiral, bona ku hemû feraxên
bona Baal û Aşera û artêşa ezma-
nan hatine çêkirin ji Perestgeha
XUDAN ve derxînin, emir da
kahînê mezin Hîlkiya û kahînên
duwemîn û notirvanên şêmûgê û
wan li derveyî Orşelîmê, di zevi-
yên Kîdronê de şewitand û xwe-
liya wan bir Beytelê. 5 Û kahînên
pûtan, ên ku qiralên Cihûdayê,
bona ku di bajarên Cihûdayê de
û li dora Orşelîmê, li cîhên bilind
buxurê bişewitînin wan wezîfedar
kiribû û yên ku ji Baal re û ji rojê
re û ji heyvê re û ji bircan re û ji
hemûya artêşa ezmanan re buxurê
vêdixistin qewirand. 6 Û Aşerayê
ji mala XUDAN derxist derveyî
Orşelîmê, newala Kîdronê û wî di
newala Kîdronê de şewitand û heli-
sand û kir toz û toza wê bi ser gorên
lawên gel ve reşand. 7 Û xaniyên
zilamên ku bona fuhşê hatine weqif
kirin, yên ku li cem mala XUDAN
in, xera kir. Pîrekan li wir, bona
Aşera çadiran dirêsandin. 8 Û ji ba-
jarên Cihûda ve hemûyên kahînan
anî û ji Gebayê heta Beer-Şebayê
cîhên bilind ên ku kahînan lê buxur
vêxistine mindar kir û li cîhê ketinê

ya deriyê Yehoşûayê serokê bajêr,
di deriyê bajêr de, cîhên bilind ên
derî yên li aliyê çepê zilam in xera
kir. 9 Lê belê kahînên cîhên bilind li
Orşelîmê hilnekişiyan pêşkêşîgeha
XUDAN, lê di nava birayên xwe
de nanê bêhavên dixwarin. 10 Û
bona Molek, ji bo tu kes lawê xwe
an jî qîza xwe ji agir ve derbas
neke, Tofeta ku di çemê lawên Hîn-
nom de ye mindar kir. 11 Û hespên
ku li cem odeya Natan-Melekê
axayê qîzan e, yê li Parvarîmê yî,
li cîhên ku ji aliyê qiralên Cihûda
ve bona rojê re hatiye tirxan kirin
û di cîhê ketina mala XUDAN
de ye, rakirin û erebeyên rojê di
agir de şewitandin. 12 Û qiral,
pêşkêşîgehên ku li ser xaniyê jorîn,
di odeya Ahaz de ne, yên ku ji aliyê
qiralên Cihûda ve hatine ava kirin
û pêşkêşîgehên ku Manaşşe di her
du hewşên mala XUDAN de çêki-
riye xera kir û wan şikestand û kuta
û toza wan bi newala Kîdronê ve
reşand. 13 Û qiral, cîhên bilind, ên
li hember Orşelîmê, li rastê çiyayê
helaqê, bona Astartiyê mekrûhê
Saydayiyan û bona tiştê mekrûhê
Moab Kemoş û bona tiştê mekrûhê
lawên Ammoniyan Mîlkom, qiralê
Îsraêlê Silêman wan ava kiriye,
mindar kir. 14 Û kevirên çikandî
perçiqand û Aşeran jêkir û cîhên
wan bi hestiyên mirovan ve dagirt.
15 Xeynî vê yekê, pêşkêşîgeha ku
li Beytelê ye û cîhê bilindê ku Ye-
roboamê lawê Nebat çêkiriye û bi
wê bi Îsraêlê ve sûc daye kirin, wê
pêşkêşîgehê jî cîhê bilind jî xera kir
û cîhê bilind şewitand û eciqand û
kir toz û Aşerayê şewitand. 16 Û
Yoşiya zivirî û gorên li wir, li çiyê
ne, dît û şand û hestiyan ji goran ve
rahişt û li gor gotina XUDAN ya
ku zilamê Xwedê, yê ku di derheqê
van gotinan de gotiye, bang kiriye,
wan li ser pêşkêşîgehê şewitand û
mindar kir. 17 Û got: Ew abîda ku
li wê derê dibînim çî ye? Û zilamên
bajêr jê re gotin: Gora ew zilamê
Xwedê, yê ku van karên ku tu ji
Cihûda hatiye û li dijî pêşkêşîgeha
Beytelê dike, bang kiriye yî! 18 Û
got: Wî berdin; bila tu kes hestiyên
wî bêaram mekin! Û hestiyên wî,
tevî hestiyên peyxamberên ku ji
Samîriyê ve hatine, berdan. 19 Û
hemû xaniyên cîhên bilind ên ku li
bajarê Samîriyê ne jî Yoşiya rakir;
qiralên Îsraêlê, bona ku XUDAN
hêrs bikin van xaniyana çêkiribûn
û li gor hemûyên ku li Beytelê ki-
ribûn ji vana re jî kirin. 20 Û hemû
kahînên cîhên bilind ên li wê derê
bûn, li ser pêşkêşîgehan qurban
kir û li ser pêşkêşîgehan, hesti-
yên mirovan şewitand û vegeriya
Orşelîmê.

*Yoşiya Cejna Fisihê Pîroz dike*

2.Dîr 35

21 Û qiral emir da hemûya netewê
û got: Ji Xwedayê xwe XUDAN

re, mîna ku di vê Pirtûka peymanê
de hatiye nivîsandin cejna Fisihê
çêbikin! 22 Bi rastî, ji rojên ser-
werên ku li ser Îsraêlê serweriyê
kirine û di hemû rojên qiralên Îs-
raêlê û qiralên Cihûdayê de, mîna
vê cejna Fisihê, tu Fisih nehat çê-
kirin; 23 lê ev Fisiha, ji XUDAN
re, di hîjdeh saliya qiral Yoşiya de
li Orşelîmê hate pîroz kirin.
24 Xeynî vêya, bona ku Yoşiya
gotinên zagonê ên ku di pirtûka
ku kahîn Hîlkiya di mala XU-
DAN de dîtiye de nivîsandine
bîne cîh, cinvanan û nêrînvanan
û terafîmê û pûtan û hemû tiştên
mekrûhên li warê Cihûdayê û li
Orşelîmê hatine dîtin, ji holê ve
malt. 25 Û li gor hemûya zagona
Mûsa, bi hemûya dilê xwe û bi
hemûya canê xwe û bi hemûya
quweta xwe qiralekî mîna wî ve-
geriya XUDAN, berî wî jî nebû û
li pêy wî jî mîna wî derneket.
26 Tenê ji ber hemû hêrs kirinên
Manaşşe bona ku XUDAN hêrs
bike çêkirine, ji ber xeyda hêr-
sa xwe yî mezin ya li dijî Cihû-
dayê XUDAN venegeriya. 27 Û
XUDAN got: Çawa Îsraêlê ji ber
çavê xwe rakiribim, ez ê Cihûda
jî rakim û vî bajarê ku bijartime,
Orşelîmê û mala ku, bona wê go-
time: Dê navê min li wir be! ez ê
ji xwe bavêjim.

*Mirina Yoşiya*

2.Dîr 35,20-26

28 Û karên Yoşiya ên ku li şunda
mayîne û her tiştên ku kiriye,
ma di pirtûka Dîrokan ya qiralên
Cihûda de ne nivîsandîne? 29 Di
rojên wî de qiralê Misirê Fîrawûn-
Neko, li dijî qiralê Asûrê hilkişiya
çemê Feratê û qiral Yoşiya li dijî
wî meşiya û gava Fîrawûn-Neko
wî li Megîddoyê dît, wî kuşt.
30 Û qûlên wî, bi mirîtî wî bi
erebê ji Megîddoyê birin û anîn
Orşelîmê û wî di gora wî de binax
kirin. Û netewa welêt, Yehoahazê
lawê Yoşiya rahiştin û wî mesh
kirin û li dêvila bavê wî, wî kirin
qiral.

*Qiraletiya Yehoahaz ya Cihûdayê*

2.Dîr 36,1-4

31 Û gava Yehoahaz bû qiral, bîst
û sê salî bû û li Orşelîmê sê meh
qiraletiyê kir û dayika wî qîza
Yêremyayê Lîbnayî bû û navê wê
Hamûtal bû. 32 Û li gor her tiştên
ku bapîrên wî kirine, tiştê ku di
çavê XUDAN de xerab e kir. 33
Û bona ku li Orşelîmê qiraletiyê
neke, Fîrawûn-Neko, di welatê
Hamatê de, li Rîblayê wî li zin-
cîrê xist û li ser welêt sed talant
zîv û talantek zêr bacê danî. 34
Û Fîrawûn-Neko, Elyakîmê lawê
Yoşiya, li dêvila bavê wî Yoşiya
kir qiral û navê wî guhert û navê
Yehoyakîm lê kir û Yehoahaz
rahişt û hat Misirê û li wir mir.

35 Û Yehoyakîm zêr û zîv da
Fîrawûn û bona ku zîvê bide, li
gor emrê Fîrawûn, bacê danî ser
welêt; bona ku bide Fîrawûn-
Neko, zîv û zêr ji netewa welêt, li
gor nerxa ku lê hatiye birrîn, ji her
kesî kişand û stend.

*Qiraletiya Yehoyakîm ya Cihûdayê*
2.Dîr 36,5-8; Dan 1,1-7

36 Gava Yehoyakîm bû qiral, bîst
û pênc salî bû û li Orşelîmê yanz-
deh sal qiraletiyê kir; dayika wî
qîza Pedayayê Rûmayî bû û navê
wê Zebîda bû. 37 Û li gor heçî
tiştên ku bapîrên wî kirine, tiştê ku
di çavê XUDAN de xerab e kir.

24 Di rojên wî de qiralê
Babîlê Nebûkadnetsar hat
û Yehoyakîm sê sal ji wî re bû qûl
û vegeriya û li dijî wî serî hilda.
2 Û XUDAN êrîşkirên Kîldani-
yan, êrîşkirên Sûriyê û êrîşkirên
Moabê û êrîşkirên lawên Am-
mon, li dijî wî şand û li gor gotina
XUDAN, ya bi navdîtiya qûlên
xwe yên peyxamber gotibû, vana
bona ku Cihûda tune bikin, li dijî
wan şand. 3 Bi rastî, bona ku
Cihûda ji ber çavê xwe rake, ev
tişt bi emrê XUDAN hate serê wî;
4 li gor hemû tiştên ku Manaşşe
kiriye, ji ber sûcên wî û ji ber xwî-
na bêsûc ya rijandiye bû, ji ber ku
Orşelîmê bi xwîna bêsûc ve dagirt
û XUDAN nexwest ku lê biborî-
ne. 5 Û karên Yehoyakîm ên li
şunda mayîne û hemû tiştên ku
kirine, ma di pirtûka Dîrokan ya
qiralên Cihûda de ne nivîsandîne?
6 Û Yehoyakîm tevî bapîrên xwe
raket û li dêvila wî, lawê wî Yeho-
yakîn bû qiral. 7 Û qiralê Misirê,
êdî carekî din ji welatê xwe der-
neket; ji ber ku qiralê Babîlê, ji
newala Misirê heta çemê Feratê,
hemû tiştên ku aidî qiralê Misirê
ne, bi dest ve xistibûn.

*Qiraletiya Yehoyakîn ya Cihûdayê*
2.Dîr 36,9-10

8 Dema Yehoyakîn bû qiral, hîj-
deh salî bû û li Orşelîmê sê meh
qiraletiyê kir û dayika wî qîza
Elnatayê Orşelîmî bû û navê wê
Nehûşta bû. 9 Û li gor heçî tiştên
ku bavê wî kirine, tiştê ku di çavê
XUDAN de xerab e kir.
10 Di wê wextê de, qûlên Nebû-
kadnetsarê qiralê Babîlê derketin
Orşelîmê û dor û ber li bajêr ve
hatin girtin. 11 Û qiralê Babîlê
Nebûkadnetsar hate bajêr û qûlên
wî, hîn dor û ber lê girtîbûn 12
û qiralê Cihûda Yehoyakîn, tevî
dayika xwe û qûlên xwe û serokên
xwe û tevî axayên qîzan çû cem
qiralê Babîlê û di heyşt saliya
qiraletiya wî de, qiralê Babîlê wî
hêsîr girt. 13 Û mîna ku XUDAN
gotibû, hemûya xezîneyên mala
XUDAN û xezîneyên mala qiral
ji wir derxistin û hemû feraxên

zêrîn, ên ku qiralê Îsraêlê Silêman
di Perestgeha XUDAN de
çêkiribû perçe kirin. 14 Û hemûya
Orşelîmê û wekî ku deh hezar
sirgûn bin, hemû serokan û hemû
egîdên bi metirsî û hemû qerat û
hesinkaran ajotin; xeynî xizanên
netewa welêt tu kes nema. 15 Û
Yehoyakîn sirgûnî Babîlê kir û
dayika qiral û jinên qiral û axayên
qîzikan û pêşhatiyên welat, bi
sirgûnî ji Orşelîmê birin Babîlê.
16 Û qiralê Babîlê, hemû zilamên
dijwar, heft hezar kesî û xeratan û
hesinkaran, hezar kesî, hemûyên
van egîdan û cengewaran anî
Babîlê sirgûnê. 17 Û qiralê
Babîlê, li dêvila Yehoyakîn, apê
wî Mattanya kir qiral û navê wî
guhert û navê Tsedekiya lê kir.

*Qiraletiya Tsedekiya ya Cihûdayê*

2.Dîr 36,11-16; Yêr 52,1-11; Îşa 39,1-10

18 Dema Tsedekiya bû qiral, bîst û
yek salî bû û li Orşelîmê yanzdeh
sal qiraletiyê kir û dayika wî qîza
Yêremyayê Lîbnayî bû û navê wê
Hamûtal bû. 19 Û li gor her ki-
rinên Yehoyakîm, ya ku di çavê
XUDAN de xerab e kir. 20 Ji ber,
heta ku XUDAN wan ji ber çavên
xwe avêt, ji ber hêrsa wî ya li dijî
Orşelîmê û Cihûda ye, wusa bû.
Û Tesedekiya li dijî qiralê Babîlê
rabû[1].

*Ketina Orşelîmê û Têkçûna Perestgehê*

Yêr 52,12-27; 39,8-18; 2.Dîr 36,17-21

25 Û wusa bû ku, di sala
nehemîn ya qiraletiya xwe
de, di meha dehan de, di roja de-
han ya mehê de, qiralê Babîlê Ne-
bukadneţsar, ew bi xwe û hemûya
artêşa wî hatin hember Orşelîmê
û li hember wê artêşgehê danîn
û li hember wê li hemûya berên
wê meterîsê ava kirin. 2 Û heta
yanzdeh saliya qiral Tsedekiya
dor û ber li bajêr hate girtin. 3 Di
roja nehemîn, ya meha çaremîn
de li bajêr xela dijwar bû û bona
netewa welêt nan tunebû. 4 Û di
dîwarê bajêr de qul[2] hate vekirin
û hemû zilamên cengê, ji rêya
derî ya di navbera her du dîwarên
ku li cem bexçê qiral de ne, şevê
reviyan û Kildanî bi dorûber li
hember bajêr bûn û qiral ji rêya
Arabayê ve çû. 5 Lê belê artêşa
Kildaniyan bera pêy qiral dan û
di deştên Erîhayê de gîhaştin wî û
hemûya artêşa wî ji cem wî belav
bû. 6 Û bi qiral girtin û derxistin
Rîblayê, cem qiralê Babîlê û di
derheqê wî de daraziyê dan. 7 Û
lawên Tsedekiya li ber çavên wî
serjê kirin û çavên Tsedekiya kor
kirin û wî li zincîrê xistin û wî bi-
rin Babîlê.

1 Serî hilda.

2 Gedûk.

8 Û di meha pêncan de, di roja
heftan ya mehê de, di sala nozdeh
ya qiralê Babîlê Nebûkadnetsar
de bû, serekê leşkerê parastinê,
Nebûzaradanê qûlê qiralê Babîlê
hate Orşelîmê. 9 Û mala XU-
DAN û mala qiral û hemû malên
Orşelîmê, her xaniyê mezin da
ber agir. 10 Û hemûya artêşa Kil-
daniyan ên ku bi serekê leşkerê
parastinê re ne, dor bi dor dîwarên
Orşelîmê xera kirin. 11 Û serekê
leşkerê parastinê Nebûzaradan,
ji ber mayiyên netewê, ên ku li
bajêr mayîne û revokên wê ên ku
derbasî aliyê qiralê Babîlê bûne
û ji ber mayiyên gel, bi sirgûnî
birin. 12 Lê belê serekê leşkerê
parastinê mîna rezvan û cotkar, ji
xizanên welêt ve li wir hişt.
13 Û Kildaniyan sitûnên tûnc ên
ku li mala XUDAN in û ling-
dankan û behra tûncî yên ku li
mala XUDAN in, perçe kirin û
tûncên wan birin Babîlê. 14 Û
qazanên ku di perestgehê de bona
xizmetê tên şuxulandin û bêran
û meqesan û kevçiyan û hemû
feraxên tûncî rahiştin. 15 Û se-
rekê leşkerê parastinê, feraxên
agir û leganan, hemûyên ku ji zêr
û ji zîv bûn rahiştin. 16 Tûncên
her du sitûnên ku Silêman bona
mala XUDAN çêkiribû, yê beh-
rekê û yê lingdankan nedihatin
weznê. 17 Bilindahiya sitûnekî
hîjdeh gez bû û li ser wê seriyekî
tûnc hebû; bilindahiya seriyekî sê
gez bû û li ser vî seriyî li hemû
dora wê gişt ji tûncê tor û karê
hinarê hebûn; sitûna duwemîn jî
tevî karê xwe yî torê wusa bû.

*Gelê Cihûda bi Babîlê ve têne sirgûnkirin*

18 Û serekê leşkerê parastinê,
Serokkahîn Seraya û kahînê du-
wemîn Tsefanya û sê notirvanê
şêmûgê rahişt 19 û ji bajêr ve
axayekî qîzan ê ku li ser zilamên
cengê ve hatibû danîn, ji muha-
sibên qiral, pênc zilamên ku li ba-
jêr bûn û nivîskarê serokê artêşê,
ê ku netewa welat li leşkeriyê ve
dinivîsîne û ji netewa welêt şêst
kesî rahiştin. 20 Û Nebûzaradanê
serokê leşkerê parastinê yî wan
rahişt û bir Rîblayê, cem qiralê
Babîlê. 21 Qiralê Babîlê li welatê
Hamatê, li Rîblayê li wan xist û
wan kuşt. Bi vî awayî Cihûda ji
axa xwe ve hate sirgûn kirin[1].

*Gedalyayê Waliyê Cihûdayê*

Yêr 52,31-34

22 Û dema em bên li netewa ku
qiralê Babîlê Nebukadnetsar
wan li warê Cihûdayê ve hiştiye,
Gedalyayê lawê Ahîkamê lawê
Şafan li ser vana bi walîtî danî.
23 Û hemû serokên artêşan, ew

---

*1* An jî: Hate ajotin.

û zilamên xwe, dema bihîstin ku
qiralê Babîlê, Gedalya bi walîtî
daniye, Simayîlê lawê Netanya
û Yohananê lawê Kareah û Sera-
yayê lawê Tanhûmetê Netofayî û
Yaazanyayê lawê Maakal, ew û
zilamên wan hatin Mîtspayê, cem
Gedalya. 24 Û Gedalya ji wan re
û ji zilamên wan re sondê da û ji
wan re got: Ji qûlên Kildaniyan
netirsin; li welêt rûnin û ji qiralê
Babîlê re qûlitiyê bikin û dê bona
we qenc bibe. 25 Û wusa bû ku, di
meha heftemîn de Simayîlê lawê
Netanyayê, lawê Elîşamanê ku ji
nîjada qiral e hat û li cem wî deh
kes hebûn û li Gedalyayê xistin û
mir; li Cihûd û Kildaniyên ku li
Mîtspayê li cem wî bûn jî xistin.
26 Û ji biçûk heta mezin, hemûya
netewê û serokên artêşgehan
rabûn û hatin Misirê, ji ber ku ji
ber Kildaniyan ditirsiyan.

*Yehoyakîn serbest tête berdan*

27 Û wusa bû ku, di sîh û heft sa-
liya sirgûniya qiralê Cihûda Yeho-
yakîn de, di meha donzdehan de,
di roja bîst û heftan ya mehê de,
sala ku qiralê Babîlê Evîl-Mero-
dak bû qiral, qiralê Cihûda Yeho-
yakîn ji girtîgehê derxist û serê wî
bilind kir 28 û bi wî re tiştên qenc
axifî û texta wî, ji textên qiralên
ku li Babîlê bi wî re ne, jortir danî
29 û kincê wî yê girtîgehê guhert.
Û Yehoyakîn di hemûyên rojên
temena xwe de li ber wî nan di-
xwar 30 û wekî zewêda[1] wî, ji
aliyê qiral ve, bona wî zewêdeyek
her timî, di hemûya rojên temena
wî de, her roj parek dihat dayîn.

[1] Xwarina wî ya rojane, an jî: Tayin.

# 1. DÎROKAN

*Pêşgotin*

Kitêbên bi navê Dîrokan têne zanîn, bûyerên ku di pirtûkên Samûyêl û Qiralan de derbas dibin, bi çavekî din dubare dike. Di pirtûkên Dîrokan de, li paş çîroka dîroka qiraletiya Îsraêlê armancek dinî girîng heye:

Li ber bêtariyên ku bi ser Îsraêl û Cihûda ve tên, Xwedê wadên xwe yên ku ji gelê xwe re kiriye diparêze û wan red nake.

Aliyê serî yê pirtûka 1. Qiralan, dîroka ji Adem heta Dawid, mîna qeyda nîjadan bi kûrtayî dinivîsîne (Birrên 1-9). Aliyê duwem yê pirtûkê (Birrên 10-29) qiraletiya Dawid, bi taybetî jî amadekariyên wî yên bona perestgehê li Orşelîmê ava bike kirine pêşve derdixîne.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-9:44 | Lîsteya Nîjadê |
| 10:1-14 | Mirina Saûl |
| 11:1-29:30 | Qiraletiya Dawid |
| a. 11:1-22:1 | Dijwarî û serkeftin |
| b. 22:2-29:30 | Amadekariyên avakirina Perestgehê |

*Nîjada Adem*

1.Mûs 5; 1.Mûs 10 û 11

1 Adem, Şît, Enoş, 2 Kenan,
Mahalalel, Yared, 3 Henox,
Metûşaleh, Lamex, 4 Nûh, Sem,
Ham û Yafet.
5 Lawên Yafet: Gomer û Me-
cuc û Maday û Yavan û Tûbal û
Meşek û Tîras. 6 Û lawên Gomer:
Aşkenaz û Dîfat û Togarma. 7 Û
lawên Yavan: Elîşa û Tarşîş, Kît-
tîm û Rodanîm.
8 Lawên Ham: Kûş û Mîtsraîm,
Pût û Kenan. 9 Û lawên Kûş: Seba
û Havîla û Sabta û Raama û Sabte-
ka. Û lawên Raama: Şeba û Dedan.
10 Û Kûş bû bavê Nîmrod û wî dest
pê kir û li rûyê erdê bû zilamekî bi

qudret. 11 Û Mîtsraîm bû bavê Lû-
diyan û Anamiyan û Lehabiyan û
Naftûhiyan 12 û Patrûsiyan û Kas-
lûhiyan – Filistiyan ji vana derke-
tin – û Kaftoriyan.13 Û Kenan bû
bavê lawê xwe yî yekemîn Tsîdo û
Het 14 û Yebûsî û Amorî û Gîrgaşî
15 û Hîvî û Arkîn û Sinî 16 û Ar-
vadî û Tsemarî û Hamatî.
17 Lawên Sem: Elam û Asûr û
Arpakşad û Lûd û Aram û Ûts
û Hûl û Geter û Meşek. 18 Û
Arpakşad, bû bavê Şelah û Şelah
bû bavê Eber. 19 Û du law ji Eber
re hatin dinê; navê yekî Peleg bû;
ji ber ku di rojên wî de rûyê erdê
hate parve kirin û navê birayê wî
Yoktan bû. 20 Û Yoktan bû bavê
Almodad û Şelef û Hatsarmavet
û Yerahîn 21 û Hadoram û Ûzal
û Dîklan 22 û Ebal û Abîmael û
Şeba 23 û Ofîr û Havîla û Yobab.
Hemûyên vana lawên Yoktan
bûn.
24 Sem, Arpakşad, Şelah, 25 Eber,
Peleg, Reû, 26 Serûc, Nahor,
Têrah, 27 Abram, ew Birahîm e.

*Nîjada Birahîm*

1.Mûs 25

28 Lawên Birahîm: Îshaq û Si-
mayîl. 29 Nîjadên vana ev in:
Lawê pêşîn yê Simayîl: Neba-
yot û Kedar û Adbeel û Mîbsam,
30 Mîşma û Dûma, Massa, Hadad
û Tema, 31 Yetûr, Nafîş û Kede-
ma. Vana lawên Simayîl in.
32 Û lawên cariya Birahîm Ketûra:
Zîmran û Yokşan û Medan û
Midyan û Yîşbak û Şûah anîne
dinê. Û lawên Yokşan: Şeba û
Dedan. 33 Û lawên Midyan: Eyfa
û Efer û Henox û Abîda û Eldaa.
Hemûyên vana lawên Ketûra ne.

*Nîjada Esav*

1.Mûs 36,1-43

34 Û Birahîm bû bavê Îshaq.
Lawên Îshaq: Esav û Îsraêl.
35 Lawên Esav: Elîfaz, Reûel û
Yeûş û Yalam û Korah. 36 Lawên
Elîfaz: Teman û Omar, Tsefî û
Gatam, Kenaz û Tîmna û Amalek.
37 Lawên Reûel: Nahat, Zerah,
Şamma û Mîzza.

*Nîjada Seîr*

38 Û lawên Seîr: Lotan û Şobal û
Tsîbeon û Ana û Dîşon û Etser û
Dîşan. 39 Û lawên Lotan: Horî û
Homam û xwuşka Lotan Tîmna.
40 Lawên Şobal: Alyan û Manahat
û Ebal, Şefî û Onam. Û lawên Tsîbe-
on: Ayya û Ana. 41 Lawên Ana:
Dîşon. Û lawên Dîşon: Hamran û
Eşban û Îtran û Keran. 42 Lawên
Etser: Bîlhan û Zaavan û Yaakan.
Lawên Dîşan: Ûts û Aran.

*Qiralên Edomê*

43 Berî ku qiralek li ser lawên
Îsraêl qiraletiyê bike, qiralên ku
li welatê Edomê qiraletiyê kiri-
ne vana ne: Belayê lawê Beor û

navê bajarê wî Dînhaba bû. 44 Û
Bela mir û li dêvila wî, Yobabê
lawê Serahê Botsrayî qiraletiyê
kir. 45 Û Yobab mir û li dêvila
wî, ji welatê Temaniyan Hûşam
qiraletiyê kir. 46 Û Hûşam mir û
li dêvila wî, Hadadê lawê Bedadê
ku di beyara Moabê de li Midya-
nê xistibû, bû qiral û navê bajarê
wî Avît bû. 47 Û Hadad mir û li
dêvila wî, Samlayê Masrekayî bû
qiral. 48 Û Samla mir û li dêvila
wî, Şaûlê ku ji Rehobota li qeraxa
çem e, bû qiral. 49 Û Şaûl mir û li
dêvila wî, Baal-Hananê lawê Ak-
bor bû qiral. 50 Û Baal-Hanan mir
û li dêvila wî, Hadad qiraletiyê kir
û navê bajarê wî Paî bû û navê jina
wî qîza Mezahab, qîza Matred
Mehetabel bû. 51 Û Hadad mir.
Û mîrên Edom: Mîr Tîmna, mîr
Alya, mîr Yetet, 52 mîr Oholî-
bama, mîr Ela, mîr Pînon, 53 mîr
Kenaz, mîr Teman, mîr Mîbtsar,
54 mîr Magdîel, mîr Îram. Mîrên
Edomê vana bûn.

*Lawên Îsraêl*

2 Lawên Îsraêl vana ne: Rû-
ben, Şîmeûn, Lêwî û Cihûda,
Îssakar û Zebûlûn, 2 Dan, Ûsiv û
Benyamîn, Naftalî, Gad û Aşer.

*Lawên Cihûda*

Serw 4,18-22; Met 1,3-6

3 Lawên Cihûda: Er û Onan û
Şela; ev her siseyan, jê re, ji qîza
Şûaya Kenanî hatin dinê. Û lawê
Cihûda yê yekemîn, Er, di çavê
XUDAN de xerab bû û wî kuşt.
4 Û bûka wî Tamar, jê re Perets
û Zerah anîn dinê. Hemû lawên
Cihûda pênc in.
5 Lawên Perets: Hetsron û
Hamûl. 6 Lawên Zerah: Zîm-
rî û Eytan û Heman û Kalkol û
Dara: Hemûyên vana pênc in.
7 Û lawên Karmîn: Akanê ku di
sûc kirina tiştê ku hatiye tirxan
kirin de, Îsraêlê xistiye derdê. 8 Û
lawên Eytan: Azarya.
9 Û lawên Hetsronê ku jê re bûyî-
ne: Yerahmeel û Ram û Kelûbay.
10 Û Ram bû bavê Ammînadab û
Ammînadab bû bavê Nahşonê begê
lawên Cihûda 11 û Nahşon bû bavê
Salman û Salman bû bavê Boaz
12 û Boaz bû bavê Obêd û Obêd bû
bavê Îşay 13 û Îşay bû bavê lawê
xwe yî yekem Elîab û lawê xwe
yî duwemîn Abînadab û lawê xwe
yî sêwemîn Şîmea 14 û lawê xwe
yî çaremîn Netanel û lawê xwe yî
pêncemîn Radday 15 û yê lawê
xwe yî şeşemîn Otsem û bû bavê
lawê xwe yî heftemîn Dawid 16 û
xwuşkên wî Serûya û Abîgaîl bûn.
Û sê lawên Serûya hebûn: Abîşay
û Yoab û Asahel. 17 Û Abîgaîl
Amasa anî dinê û bavê Amasa, Ye-
terê Simayîlî bû.
18 Û Kalebê lawê Hetsron, ji jina
xwe Azûba û ji Yêrîotê bû bavê
zarokan û lawên pîrekê vana bûn:

Yeşer û Şobab û Ardon. 19 Û
Azûba mir û Kaleb, bi jinitî Efrat
ji xwe re anî û wê jî jê re Hûr anî
dinê. 20 Û Hûr bû bavê Ûrî û Ûrî
bû bavê Betsalel.
21 Û paşî vê yekê, Hetsron, ket
cem qîza Makîrê ku bavê Gîlead e
û wê pîrekê di şêst salî de anî û jê
re Segûb anî dinê. 22 Û Segûb bû
bavê Yaîr, li welatê Gîleadê, bîst
û sê bajarên wî hebû. 23 Û Geşûr
û Aram, navçeyên Yaîr û Kenat
û gundên wê, şêst bajarî ji wan
ve stendin. Vana hemûyan lawên
Makîrê bavê Gîlead bûn. 24 Û
paşî ku Hetsron li Kaleb-Efratayê
mir, paşê wî, Abiyaya jina Hets-
ron, jê re Aşhûrê bavê Tekoa anî
dinê.
25 Û lawên Yerahmeelê lawê
yekemînê Hetsron: Lawê wî yê
yekemîn Ram û Bûna û Oren û Ot-
sem, Ahiya. 26 Û jinekî dinî Yerah-
meel hebû û navê wê Atara bû;
dayika Onam ew bû. 27 Û lawên
Ramê lawê yekemînê Yerahmeel;
Maats û Yamîn û Eker. 28 Û lawên
Onam Şammay û Yada bûn. Û
lawên Şammay: Nadab û Abîşûr.
29 Û navê pîreka Abîşûr Abîhaîl
bû û jê re Ahban û Molîd anîn
dinê. 30 Û lawên Nadab: Seled
û Appaîm; lê belê Seled, bê law
mir. 31 Û lawên Appaîm: Îşî. Û
lawên Îşî: Şeşan. Û lawên Şeşan:
Ahlay. 32 Û lawên Yadanê birayê
Şammay: Yeter û Yonatan û Yeter
bêyî law mir. 33 Û lawên Yonatan:
Pelet û Zaza. Vana lawên Yerah-
meel bûn. 34 Û lawên Şeşa tune
bûn, lê belê qîzên wî hebûn. Û ko-
lekî Şeşa, yekî Misirî hebû û navê
wî Yarha bû. 35 Û Şeşan, qîza xwe
bi jinitî da qûlê xwe Yarha û jê re
Attay anî dinê. 36 Û Attay bû bavê
Natan û Natan bû bavê Zabad.
37 Û Zabad bû bavê Eflal û Eflal
bû bavê Obêd 38 û Obêd bû bavê
Yehû û Yehû bû bavê Azarya 39 û
Azarya bû bavê Helets û Helets bû
bavê Eleasa 40 û Eleasa bû bavê
Sîsmay û Sîsmay bû bavê Şallûm
41 û Şallûm bû bavê Yekamya û
Yekamya bû bavê Elîşama.
42 Û lawên Kalebê birayê Yerah-
meel: Lawê wî yê yekem Meşa,
ew bavê Zîf bû û lawên Mareşanê
bavê Hebron. 43 Û lawên Heb-
ron: Korah û Tappûah û Rekem
û Şema. 44 Û Şema bû bavê
Yorkeam û bavê Raham û Re-
kem bû bavê Şammay. 45 Û lawê
Şammay Maon bû û Maon bavê
Beyt-Tsûr bû. 46 Û Eyfaya cari-
ya Kaleb Haran û Motsa û Gazez
anîn dinê û Haran bû bavê Gazez.
47 Û lawên Yahday: Regem û Yo-
tan û Geşan û Pelet û Eyfa û Şaaf.
48 Maakaya cariya Kaleb, Şeber
û Tîrhana anîn dinê. 49 Û Şaafê
bavê Madmannan û Şevayê bavê
Makbena û bavê Gîbean anîn dinê
û qîza Kaleb Aksa bû.
50 Lawên Kalebê lawê Hûrê ku

lawê yekem yê Efratan bû ev
bûn: Şobalê bavê Kîryat-Yearîm,
51 Salmayê bavê Beytlehem,
Harefê bavê Beyt-Gader. 52 Û
lawên Şobalê bavê Kîryat-Yearîm
jî hebûn; Haroe, nêviyê Menûhi-
yan. 53 Û eşîrên Kîryat-Yearîm:
Yîtriyan û Pûtiyan û Şûmatiyan
û Mişraiyan; ji vana Soraiyan û
Eştaoliyan derketin. 54 Lawên
Salma: Beytlehem û Netofayi-
yan, Atrot-Beyt-Yoab û nêviyên
Manahatiyan[1], Soriyan. 55 Eşîrên
katibên[2] ku li Yabetsê ne: Tirati-
yan, Şîmeatiyan, Sûkatiyan. Ev
zilamên ku nîjada Hammatê bavê
mala Rekabê ye, Kenî ne.

*Lawên Dawid*

2.Sam 3,2-5; 5,13-16

3 Û lawên wî, ên ku li Hebronê
ji Dawid re bûne vana ne:
Lawê pêşîn Yîzreêlî, Amnonê ku
ji Ahînoam bûye; yê duwemîn,
Danîêlê ku ji Abîgaîla Karmêlî
bûye; 2 yê sêwemîn Abşalomê
Lawê Maakaya qîza Talmayê qi-
ralê Geşûrê yî; yê çaremîn, Ado-
niyayê lawê Haggît; 3 yê pên-
cemîn Şefatyayê ku ji Abîtay ve
bûyiye; yê şeşemîn, Îtreamê ku
ji jina wî Egla bûyiye; 4 li Heb-
ronê, bona wî şeş law bûn û li wir
heft sal û şeş meh qiraletiyê kir.
Û li Orşelîmê sîh û sê sal qirale-
tiyê kir 5 û li Orşelîmê vana jê
re bûn: Şîmeayê ku ji Bat-Şûaya
qîza Ammîel jê re bûyiye û Şobab
û Natan û Silêman, çar 6 û Îhbar û
Elîşama û Elîfelet 7 û Noga û Ne-
feg û Yafîa 8 û Elîşama û Elyada
û Elîfelet, neh. 9 Ji zarokên cari-
yan wêdetir hemû lawên Dawid
in û Tamar xwuşka wan e.

*Nîjada Qiralên Cihûda*

10 Û lawê Silêman Rehoboam û
lawê wî Abiya, lawê wî Asa, lawê
wî Yehoşafat, 11 lawê wî Yoram,
lawê wî Ahazya, lawê wî Yoaş,
12 lawê wî Amatsya, lawê wî
Azarya, lawê wî Yotam, 13 lawê
wî Ahaz, lawê wî Hîzkiya, lawê wî
Manaşşe, 14 lawê wî Amon, lawê
wî Yoşiya. 15 Û lawên Yoşiya:
Lawê wî yê pêşîn Yohanan, yê du-
wemîn Yehoyakîm, yê sêwemîn
Tsedekiya, yê çaremîn Şallûm.
16 Û lawên Yehoyakîm: Lawê
wî Yekonya, lawê wî Tsedekiya.
17 Û lawên Yekonyayê sirgûn e:
Lawê wî Şealtîel 18 û Malkîram
û Pedaya û Şenatsar, Yekamya,
Hoşama û Nebadya. 19 Û lawên
Pedaya: Zerûbbabel û Şîmeî. Û
lawên Zerûbbabel: Meşûllam û
Hananya û xwuşka wan Şelomît
20 û Haşûba û Ohel û Berekya
û Hasadya, Yûşab-Hesed, pênc.
21 Û lawên Hananya: Pelatya

1 Hazî-Hammanahatiyan.

2 Nivîsyar.

û Yeşaya; lawên Refaya: lawên
Arnan, lawên Obadya, lawên
Şekanya. 22 Û lawên Şekanya:
Şemaya. Û lawên Şemaya: Hattûş
û Îgal û Barîah û Nearya û Şafat,
şeş. 23 Û lawên Nearya: Elyoe-
nay û Hîzkiya û Azrîkam, sê. 24
Û lawên Elnoenay: Hodavya û
Elyaşîb û Pelaya û Aqûp û Yoha-
nan û Delaya û Ananî, heft.

*Nîjada Cihûda*

4 Lawên Cihûda: Perets, Hets-
ron û Karmî û Hûr û Şobal. 2
Û Reayayê lawê Şobal bû bavê
Yahat û Yahat bû bavê Ahûmay
û Lahad. Eşîrên Sorayiyan vana
ne. 3 Û lawên bavê Eytam, vana
ne: Yîzreêl û Îşma û Îdbaş û navê
xwuşka wan Hatselelponî ye 4 û
bavê Gedor Penûel û bavê Hûşa
Ezer. Vana lawên Hûrê bavê
Beytlehem û yê ku yekem bûyiyê
Efratayê ne. 5 Û du jinên Aşhûrê
bavê Tekoa hebûn, Hela û Naara.
6 Û Naara jê re Ahûzzam û He-
fer û Temenî û Haahaştarî anîn
dinê. Vana lawên Naara bûn.
7 Û lawên Hela: Tseret, Yîtshar û
Etnan. 8 Û Hakkots bû bavê eşîra
Aharhelê lawê Anûb û Tsobeba û
Harûm. 9 Û Yabets ji birayên xwe
hîn jî birêztir bû û dayika wî, bi
gotina: Min bi jan wî anî dinê!
Navê Yabets lê kir. 10 Û Yabets
ji Xwedayê Îsraêlê re feryad kir û
got: Xwezîka tu min bi rastî pîroz
bike û sînorên min fireh bike û
destê te bi min re be û bona ku
êşê nekişînim min ji şerê ve xelas
bike! Û Xwedê, tiştê ku xwestibû
da wî. 11 Û Kelûbê birayê Şûhan
bû bavê Mehîr û ew bavê Eşton
bû. 12 Û Eşton bû bavê Tehînnayê
ku bavê Beyt-Rafan û Paseah û
Îr-Nahaş. Vana zilamên Reka ne.
13 Û lawên Kenaz: Otnîel û Sera-
ya. Û lawên Otnîel: Hatat. 14 Meo-
notay bû bavê Ofra û Seraya bû
bavê Yoabê ku bavê Ge-Haraşîm
e; ji ber ku vana hunermend bûn.
15 Û lawên Kalebê lawê Yefûn-
ne: Îrû, Ela û Naam û lawên Ela û
Kenaz. 16 Û lawên Yehallel: Zîf
û Zîfa, Tîrya û Asarel. 17 Û lawên
Esra: Yeter û Mered û Efer û Ya-
lon û jina wî Mîryam û Şamma
û Îştahê bavê Eştemoa anî dinê.
18 Û jina wî ya ku Cihûdî ye,
Yeredê bavê Gedor û Heberê
bavê Soko û Yekûtîêlê bavê Za-
noah anî dinê. Û lawên Bîtyaya
qîza Fîrawûn, ya ku Mered bi
wê re zewicî bû vana ne. 19 Û
lawên xwuşka Naham ya ku jina
Hodiya ye, Garmî, bavê Keîla û
Eştemoayê Maakayî bûn. 20 Û
lawên Şîmon: Amnon û Rînna,
Ben-Hanan û Tîlon. Û lawên Îşî:
Zohet û Ben-Zohet. 21 Lawên
Şelayê lawê Cihûda: Erê bavê
Leka û Laadayê bavê Mareşa û
ji mala Aşbea, eşîrên mala kesên
ku kitanên tenik çêdikin 22 û

Yokîm û zilamên Kozeba û Yoaş û Saraf, vana li Moabê rêvebirtiyê kirin û Yaşûbî-Lehem. Û van qeydna kevn in. 23 Vana kûzvan bûn û yên ku li Netaîmê û li Gedarayê rûdinin bûn û di mîna ku di karê qiral de bin, li wir bi wî re rûdiniştin.

*Nîjada Şîmeûn*

4.Mûs 26,12-14

24 Lawên Şîmeûn: Nemûêl û Yamîn, Yarîb, Zerah, Şaûl; 25 lawê wî Şallûm, lawê wî Mîbsam, lawê wî Mîşma. 26 Û lawên Mîşma: Lawê wî Hammûel, lawê wî Zakkûr, lawê wî Şimeî. 27 Û şanzdeh lawên Şîmeî û şeş qîzên wî hebûn, lê belê lawên birayên wî ne zêde bûn û hemû eşîra wan qasî lawên Cihûda zêde nebûn. 28 Û li Beer-Şebayê û li Moladayê û li Hatsar-Şûalê 29 û li Bîlhayê û li Etsemê û li Toladê 30 û li Bêtûêlê û li Hormayê û li Zîklagê 31 û li Beyt-Markabotê û li Hatsar-Sûsîmê û li Beyt-Bîriyê û li Şaarayîmê rûniştin. Heta qiraletiya Dawid, bajarên wan ev bûn. 32 Û gundên wan Eytam û Aîn, Rîmmon û Token û Aşan, pênc bajar 33 û hemû gundên li dora van bajara ne, yên heta Baalê ên wan bûn. Cîhên ku ew lê rûdiniştin vana bûn û nivîsa wanî nîjadê heye. 34 Û Meşobab û Yamlek û Yoşayê lawê Amatsya 35 û Yowêl û lawê Asîel, lawê Seraya, lawê Yoşîba Yehû 36 û Elyoenay û Yaakoba û Yeşohaya û Asaya û Adîel û Yesîmîel û Benaya 37 û Zîzayê lawê Şîfiyê, lawê Allonê, lawê Yedayayê, lawê Şîmriyê, lawê Şemaya, 38 vana ku bi navên xwe dihatin bang kirin di eşîrên xwe de beg bûn û malên bapîrên wan zehf zêde bûn. 39 Û bona ji bo keriyên xwe çêregehê bibînin, çûn heta cîhê ketina Gedorê, ber bi rojhilatê. 40 Û çêregeha qenc û geş dîtin û welat fireh û aram û bêxem bû; ji ber, yên ku berê li wir rûdiniştin, ji Hamê bûn. 41 Û vana ku bi navên xwe hatin nivîsandin, di rojên qiralê Cihûda Hîzkiya de hatin û li çadirên wan û li Meûnên ku li wir in xistin û wan bi tûmî tune kirin, heta îrojê wusa ye û li cîhên wan rûniştin; ji ber ku li wir, bona keriyên wan çêregeh hebû. 42 Û ji wan, ji lawên Şîmeûn, pênc sed kes çûn çiyayê Seîrê û lawên Îşî, Pelatya û Nearya û Refaya û Ûzzîel li ser wan bûn. 43 Û li yên ku ji ber revokên Amalekiyan mane xistin û heta îroj li wir rûniştin.

*Nîjada Rûben, Gad û Manaşşe*

5 Û lawên Rûbenê ku lawê yekemînê Îsraêlê ye, – ji ber ku lawê wî yê yekem bû; lê belê madem ku nivîna bavê xwe mindar kir, mafê wî yê lawê yekemîniyê ji lawên Ûsivê lawê Îsraêl re

hate dayîn û regeza wî, li gor mafê
lawê yekemîniyê nehat jimartin.
2 Ji ber ku Cihûda ji birayên xwe
hîn jî xwurttir bû û serwer ji wî ve
hat; lê belê mafê lawê yekemîniyê
yê Ûsiv bû. – 3 Lawên Rûbenê ku
lawê yekemînê Îsraêlê ye: Henox
û Pallû, Hetsron û Karmî. 4 Lawên
Yowêl: Lawê wî Şemaya, lawê
wî Gog, lawê wî Şîmeî, 5 lawê
wî Mîka, lawê wî Reaya, lawê wî
Baal, 6 lawê wî Beerayê ku qiralê
Asûrê Tîlgat-Pîlneser wî ajotibû;
ew bi xwe begê Rûbeniyan bû. 7 Û
birayên wî li gor eşîrên xwe; dema
regezên nijadan hatin jimartin: Serî
Yeîel û Zekarya 8 û Belayê lawê
Azazê lawê Şemayê lawê Yowêl,
ew heta Nebo û heta Baal-Meonê
li Aroerê rûdinişt 9 û berbi rojhilatê
heta cîhê ku ji çemê Feratê ketina
çolê rûdinişt, ji ber ku dewarên
wan li warê Gîleadê zêde bûn.
10 Û di rojên Saûl de, bi Hagriyan
re cengê kirin û vana bi destên wan
ve ketin û di rojhilata Gîleadê de,
ew di hemûya welêt de, di çadirên
wan de rûniştin.
11 Û lawên Gad, di warê Başanê
de heta Salekayê li hember wan
rûniştin 12 û serokê wan Yowêl bû
û yê duwem Şafam û Yanay û li
Başanê Şafat bû. 13 Û birayên wan
ên ku ji mala bapîrên wan in: Mî-
kael û Meşûllam û Şeba û Yoray û
Yakan û Zîa û Eber, heft. 14 Vana
lawên Abîhaîlê, lawê Hûriyê, lawê
Yaroahê, lawê Gîleadê, lawê Mîka-
elê, lawê Yeşîşayê, lawê Yahdoyê,
lawê Bûz bûn. 15 Ahiyê lawê Ab-
dîêlê, lawê Gûnî, serê malên bavên
wan bû. 16 Û li Gîleadê, li Başanê
û li navçeyên wê û heta cîhên
derketina wê di hemû çêregehên
Şaronê de rûniştin. 17 Di rojên qi-
ralê Cihûda Yotam de û di rojên
qiralê Îsraêlê Yeroboam de vana
hemûyan li gor regezên xwe hatin
jimartin[1].
18 Lawên Rûben û Gadiyan û nê-
viya nijada Manaşşe, ji zilamên
egîd, çel û çar hezar û heft sed û
şêst kesên ku şûr û mertal bi wan
re ne û bi kevanê ve tîrê diavêjin
û yên ku bona cengê perwerdekirî
ne û derdikevin artêşê, bûn. 19 Û
bi Hagriyan, bi Yetûr û Nafîş û
Nodab re cengê kirin. 20 Û li dijî
wan, ji vana re alîkarî hate kirin û
Hagrî û hemûyên ku bi wan re ne,
hatin dayîna destên vana; ji ber ku
di cengê de ji Xwedê re feryad kirin
û wan bihîst, ji ber ku bi wî ve ewle
bûbûn. 21 Û heywanên wan, pêncî
hezar heb deveyên wan û du sed û
pêncî hezar hep mîhên wan û du
hezar kerên wan û sed hezar zilamî
ajotin û birin. 22 Ji ber ku yên hatin
lêxistin û mirin zehf bûn, ji ber ku
ev ceng ji Xwedê bû. Û heta wexta
sirgûnê li cîhên wan rûniştin.
23 Û lawên nêviyê nijada Manaşşe

[1] Li secereta nijadê hatin nivîsandin.

di welêt de rûniştin; ji Başanê, heta Baal-Hermonê û Senîrê û heta çiyayê Hermonê belav bûn.
24 Û serê mala bapîrên wan vana bûn: Efer û Îşî û Eliyêl û Azriyêl û Yêremya û Hodavya û Yahdiyêl, mêrxasên dilawêr, zilamên bi nav û deng, serokên mala bapîrên xwe bûn.
25 Û li dijî Xwedayê bapîrên xwe sûcê kirin û li pêy îlahên neteweyên welêt ên ku Xwedê ji ber wan helaq kiribû zinê kirin.
26 Û Xwedayê Îsraêlê, ruhê qiralê Asûrê Pûl û ruhê qiralê Asûrê Tîlgat-Pîlneser hişyar kirin û wan, Rûbeniyan û Gadiyan û nêviya nîjada Manaşşe ajotin û wan birin Halahayê û Haborê û Harayê û çemê Gozanê. Heta îroj li wan dera ne.

*Nîjada Lêwî*

2.Mûs 6,16-25

6 Lawên Lêwî: Gerşom, Kohat û Merarî. 2 Û lawên Kohat: Amram, Yîtshar û Hebron û Ûzzîel. 3 Û zarokên Amram: Harûn û Mûsa û Mîryam. Û lawên Harûn: Nadab û Abîhû, Eleazar û Îtamar. 4 Eleazar bû bavê Pînehas, Pînehas bû bavê Abîşûa
5 û Abîşûa bû bavê Bûkkî û Bûkkî bû bavê Ûzzî 6 û Ûzzî bû bavê Zerahya û Zerahya bû bavê Merayot. 7 Merayot bû bavê Amarya û Amarya bû bavê Ahîtûb 8 û Ahîtûb bû bavê Tsadok û Tsadok bû bavê Ahîmaats 9 û Ahîmaats bû bavê Azarya û Azarya bû bavê Yohanan 10 û Yohanan bû bavê Azarya; li Orşelîmê yê di mala ku Silêman ava kiribû de kahîntiyê dikir ew bû 11 û Azarya bû bavê Amarya û Amarya bû bavê Ahîtûb 12 û Ahîtûb bû bavê Tsadok û Tsadok bû bavê Şallûm
13 û Şallûm bû bavê Hîlkiya û Hîlkiya bû bavê Azarya 14 û Azarya bû bavê Seraya û Seraya bû bavê Yehotsadak 15 û dema XUDAN bi destê Nebûkadnetsar Cihûda û Orşelîmê ajot, Yehotsadak çû sirgûnê.
16 Lawên Lêwî: Gerşom, Kohat û Merarî. 17 Û navên lawên Gerşom vana ne: Lîbnî û Şimeî. 18 Û lawên Kohat Amram û Yîtshar û Hebron û Ûzzîel bûn. 19 Lawên Merarî: Mahlî û Mûşî. Û li gor malên bapîrên xwe, eşîrên Lêwiyiyan vana bûn. 20 Ji Gerşom: Lawê wî Lîbnî, lawê wî Yahat, lawê wî Zîmma, 21 lawê wî Yoah, lawê wî Îddo, lawê wî Zerah, lawê wî Yeateray. 22 Lawên Kohat: Lawê wî Ammînadab, lawê wî Korah, lawê wî Assîr, 23 lawê wî Elkana û lawê wî Ebyasaf û lawê wî Assîr,
24 lawê wî Tahat, lawê wî Ûrîel, lawê wî Ûzziya û lawê wî Şaûl.
25 Û lawên Elkana: Amasay û Ahîmot. 26 Gava mirov were Elkana, lawên Elkana: Lawê wî

Tsofay û lawê wî Nahat, 27 lawê
wî Elîab, lawê wî Yeroham, lawê
wî Elkana. 28 Û lawên Samûyêl:
Lawê wî yê pêşîn Yowêl û yê du-
wem Abiya. 29 Lawên Merarî:
Mahlî, lawê wî Lîbnî, lawê wî
Şimeî, lawê wî Ûzza, 30 lawê wî
Şimea, lawê wî Haggiya, lawê wî
Asaya.

*Murxgerên Perestgehê*

31 Û paşî ku Sindoqa Peymanê
gîhaşt aramiyê, zilamên ku Da-
wid wan li mala XUDAN daniye
xizmeta sitranê vana ne. 32 Û heta
ku Silêman li Orşelîmê mala XU-
DAN ava kir, li ber şunwara Ça-
dira Civandinê bi sitranê xizmetê
dikirin û li gor ûsilên xwe di xiz-
metên xwe de sekinîn. 33 Û yên ku
disekinîn û lawên wan vana ne. Ji
lawên Kohatî: Hemanê qesîdevanê
ku lawê Yowêlê, lawê Samûyêlê,
34 lawê Elkanayê, lawê Yerohamê,
lawê Eliyêlê, lawê Toahê, 35 lawê
Tsûfê, lawê Elkanayê, lawê Ma-
hatê, lawê Amasayê, 36 lawê Elka-
nayê, lawêYowêlê, lawê Azaryayê,
lawê Tsefanyayê, 37 lawê Tahatê,
lawê Assîrê, lawê Ebyasafê, lawê
Korahê, 38 lawê Yîtsharê, lawê
Kohatê, lawê Lêwiyê, lawê Îsraêl.
39 Û birayê wî Asafê li aliyê wî yî
rastê sekiniye, Asafê lawê Berek-
yayê, lawê Şîmeayê, 40 lawê Mîka-
elê, lawê Baaseyayê, lawê Malki-
yayê, 41 lawê Etniyê, lawê Zerahê,
lawê Adayayê, 42 lawê Eytanê,
lawê Zîmmayê, lawê Şîmeyiyê,
43 lawê Yahatê, lawê Gerşomê,
lawê Lêwî. 44 Û lawên birayê wan
Merariyê ku li aliyê wî yî çepê se-
kiniye: Eytanê lawê Kîşînê, lawê
Abdiyê, lawê Mallûkê, 45 lawê
Haşabyayê, lawê Amatsyayê, lawê
Hîlkiyayê, 46 lawê Amtsiyê, lawê
Baniyê, lawê Şemerê, 47 lawê
Mahliyê, lawê Mûşiyê, lawê Me-
rariyê, lawê Lêwî. 48 Û birayên wî
Lêwiyiyan, ji bona hemû xizmetên
mala Xwedê hatin dayînê.

*Nijada Harûn*

49 Lê belê Harûn û lawên wî, li
gor her tiştên ku qûlê Xwedê Mûsa
emir daye, bona her karên Cîhê
Herî Pîroz û bona ji bo Îsraêlê
kefaretê bikin, li ser pêşkêşîgeha
pêşkêşiyên şewitandinê û li ser
pêşkêşîgeha buxurê pêşkêşiyan
pêşkêş dikirin. 50 Û lawên Harûn
vana ne: Lawê wî Eleazar, lawê wî
Pînehas, lawê wî Abîşûa, 51 lawê
wî Bûkkî, lawê wî Ûzzî, lawê wî
Zerahya, 52 lawê wî Merayot,
lawê wî Amarya, lawê wî Ahîtûb,
53 lawê wî Tsadok, lawê wî Ahî-
maats.

*Bajarên ku Lêwiyî lê dijîn*

Yêşû 21

54 Û di sînorên wan de li gor qo-
naxên wan, cîhên ku rûdiniştin
vana ne: Ji lawên Harûn, heta

eşîrên Kohatî, ji ber ku vijaga
pêşîn ji wan re ketibû, 55 li warê
Cihûda Hebronê û çêregehên xwe
yên li dora wê dan wan; 56 lê belê
gund û zeviyên bajêr, dan Ka-
lebê lawê Yefûnne. 57 Û ji lawên
Harûn re, wekî bajarên ku xwe tê
de bisitirînin Hebronê û Lîbna û
çêregehên wê û Yattîrê û Eştemoa
û çêregehên wê 58 û Hîlen û çê-
regehên wê û Debîr û çêregehên
wê 59 û Aşan û çêregehên wê û
Beyt-Şemeş û çêregehên wê 60 û
ji nîjada Benyamîn, Geba û çêre-
gehên wê û Alemet û çêregehên
wê û Anatot û çêregehên wê hatin
dayîn. Hemû bajarên wan, li gor
eşîrên wan sêzdeh bajar bûn.

61 Û ji lawên Kohat ên ku zêde
mayîne re, ji eşîra vê nîjadî, ji
nêviyê Manaşşe re, bi vijagê deh
bajar hate dayîn. 62 Û ji lawên
Gerşom re, li gor eşîrên wan, ji
nîjada Îssakar û ji nîjada Aşer û ji
nîjada Naftalî û li Başanê, ji nîjada
Manaşşe, sêzdeh bajar hate dayîn.
63 Ji lawên Merarî re, li gor eşîrên
wan, ji nîjada Rûben û ji nîjada
Gad û ji nîjada Zebûlûn bi vijagê
donzdeh bajar hate dayîn. 64 Û
lawên Îsraêl wan bajaran û çêre-
gehên wan dan Lêwiyiyan. 65 Û
ji nîjada lawên Cihûda û ji nîjada
lawên Şîmeûn û ji nîjada lawên
Benyamîn, van bajarên ku bi na-
vên wan ve tên bîranîn, bi vijagê
dan. 66 Û ji eşîrên lawên Kohat,
bajarên sînorê yên hinekan bi nî-
jada Efrayîm re hebûn. 67 Û wekî
bajarên ku xwe pê bisitirînin, di
çiyayiya Efrayîm de Şekem û çê-
regehên wê û Gezer û çêregehên
wê 68 û Yokmeam û çêregehên
wê û Beyt-Horon û çêregehên
wê 69 û Ayyalon û çêregehên wê
û Gat-Rîmmon û çêregehên wê
70 û ji nêviyê nîjada Manaşşe
Aner û çêregehên wê û Bîleam û
çêregehên wê, dan ji ber mayiyên
eşîra lawên Kohat.

71 Ji lawên Gerşom re, ji nêviyê
eşîra nîjada Manaşşe, li Başanê
Golan û çêregehên wê û Aştarot
û çêregehên wê 72 û ji nîjada
Îssakar, Kedeş û çêregehên wê,
Daberat û çêregehên wê 73 û Ra-
mot û çêregehên wê û Anem û
çêregehên wê 74 û ji nîjada Aşer
Maşal û çêregehên wê û Abdon û
çêregehên wê 75 û Hûkok û çêre-
gehên wê û Rehob û çêregehên wê
76 û ji nîjada Naftalî, li Galîleyê
Kedeş û çêregehên wê û Ham-
mon û çêregehên wê û Kîryataîm
û çêregehên wê dan.

77 Ji yên ji ber Lêwiyiyan mane,
ji lawên Merarî re, ji nîjada Ze-
bûlûn, Rîmmono û çêregehên
wê, Tabor û çêregehên wê 78 û li
Erîhayê, ji Urdunê wêdetir de, li
rojhilata Urdunê, ji nîjada Rûben;
li çolê Betser û çêregehên wê û
Yahtsa û çêregehên wê 79 û Ke-
demot û çêregehên wê û Mefaat û

çêregehên wê 80 û ji nîjada Gad,
li Gîleadê Ramot û çêregehên wê
û Manahaîm û çêregehên wê 81 û
Heşbon û çêregehên wê û Yazer û
çêregehên wê dan.

*Nîjada Îssakar, Benyamîn û Naftalî*
4.Mûs 26,23-25

7 Û ji lawên Îssakar: Tola û Pûa,
Yaşûb û Şîmron, çar. 2 Û lawên
Tola: Ûzzî û Refaya û Yerîel û
Yahmay û Îbsam û Şêmûêl, se-
rokên malên bapîrên xwe, ji Tola,
ji nifşeyên xwe egîdên dilawêr;
di rojên Dawid de hejmarên wan
bîst û du hezar û şeş sed bûn. 3 Û
lawên Ûzzî, Îzrahya. Û lawên Îz-
rahya: Mîkael û Obadya û Yowêl
û Îşşiya, pênc; ew hemû serok
bûn. 4 Û tevî vana li gor nîjadên
wan, ji malên bavan ve, liqên ku
ji artêşê derdiketin cengê sîh û şeş
hezar kes bûn; ji ber ku gellek jin
û zarokên wan hebûn. 5 Û di nava
hemû eşîrên Îssakar de birayên
wan, egîdên dilawêr, hemûyên ku
bi regezê ve dihatin hesibandin,
heyştê û heft hezar bûn.
6 Lawên Benyamîn: Bela û Beker
û Yedîel, sisê. 7 Û lawên Bela: Ets-
bon û Ûzzî û Ûzzîel û Yerîmot û Îrî,
pênc; serokên mala bapîran, egîdên
dilawêr û yên ku bi regezê ve ha-
tine jimartin; bîst û du hezar û sîh
û çar. 8 Û lawên Beker: Zemîra û
Yoaş û Elîezer û Elyoenay û Omrî
û Yeremot û Abiya û Anatot û Ale-
met. Hemûyên vana lawên Be-
ker bûn. 9 Û vana serokên malên
bapîrên xwe, egîdên dilawêr, yên
li gor nîjadên xwe bi regezê ve ha-
tine jimartin, bîst hezar û du sed.
10 Û lawên Yedîayêl: Bîlhan. Û
lawên Bîlhan: Yeûş û Benyamîn û
Ehûd û Kenaana û Zetan û Tarşîş û
Ahîşahar. 11 Hemûyên vana egîdên
dilawêr yên bona cengê derketine
artêşê, li gor serokê malên bapîrên
xwe lawên Yedîayêl, hivdeh hezar û
du sed bûn. 12 Û lawên Îrî: Şûppîm
û Hûppîm; lawên Aher, Hûşîm.
13 Lawên Naftalî: Yahtsiyêl û
Gûnî û Yetser û Şallûm, lawên
Bîlha.

*Nîjada Manaşşe, Efrayîm û Aşer*

14 Lawên Manaşşe: Asriyêlê ku
cariya wî ya Aramî aniye dinê;
ew pîreka Makîrê bavê Gîlead
anî dinê. 15 Û Makîr ji Hûppîm
û ji Şûppîm jinekê stend û navê
xwuşka wî Maaka bû û navê ya
duwemîn Tselofhad bû û qîzên
Tselofhad hebûn. 16 Û Maakaya
jina Makîr lawekî anî dinê û navê
Pereş lê kir û navê birayê wî Şereş
bû û lawên wî Ûlam û Rakem
bûn. 17 Û lawên Ûlam: Bedan.
Lawên Gîleadê, lawê Makîrê,
lawê Manaşşe vana bûn. 18 Û
xwuşka wî, Hammoleket Îşhod,
Abîezer û Mahla anîn dinê. 19 Û
lawên Şemîda Ahyan û Şekem û
Lîkhî û Anîam bûn.

20 Û lawên Efraîm: Şûtelah û
lawê wî Bered û lawê wî Tahat û
lawê wî Eleada û lawê wî Tahat
21 û lawê wî Zabad û lawê wî
Şûtelah û Ezer û Elead, zilamên
Gat, ên ku li welêt hatine dinê
vana kuştin, ji ber ku bona hey-
wanên wan rahêlin û bibin dake-
tibûn. 22 Û bavên wan Efrayîm
gellek roj şînê kişand û birayên wî
bona xemrevînî jê re bikin hatin.
23 Û ket cem pîreka xwe û pîrek
ducanî bû û lawekî anî dinê û bavê
wî, navê Berîa lê kir, ji ber ku di
mala wî de asîw hebû. 24 Û qîza
wî Şeera bû; yê ku Beyt-Horona
jêrîn û jorîn û Ûzzen-Şeera ava ki-
riye ew e. 25 Û lawê wî Refah û
Reşef û lawê wî Telah û lawê wî
Tahan 26 û lawê wî Ladan û lawê
wî Ammîhûd û lawê wî Elîşama
27 û lawê wî Nûn, lawê wî Yêşû.
28 Û milkên wan û cîhên ku lê
rûdiniştin, Beytel û navçeyên li
wir û li aliyê rojhilatê Naaran û li
aliyê rojavayê Gezer û navçeyên
wê û heta Azza û navçeyên wê
Şekem û navçeyên wê 29 û li cem
sînorên lawên Manaşşe, Beyt-
Şean û navçeyên wê, Taanak û
navçeyên wê, Megîddo û navçe-
yên wê, Dor û navçeyên wê bûn.
Lawên Ûsivê lawê Îsraêl li van
deran rûdiniştin.
30 Lawên Aşer: Yîmna û Yîşva û
Yîşvî û Berîa û xwuşka wan Serah.
31 Û lawên Berîa: Bavê Heber û
Bîrzaît Malkîêl. 32 Û Heber bû bavê
Yaflet û Şomer û Hotam û xwuşka
wan Şûa. 33 Û lawên Yaflet: Pasak û
Bîmhal û Aşvat. Lawên Yaflet vana
ne. 34 Û lawên Şemer: Ahî û Roh-
ga, Yehûbba û Aram. 35 Û lawên
birayê wî Helem: Tsofah û Îmna û
Şeleş û Amal. 36 Û lawên Tsofah:
Sûah û Harnefer û Şûal û Berî û
Îmra, 37 Betser û Hod û Şamma û
Şîlşah û Îtran û Beera. 38 Û lawên
Yeter: Yefûnne û Pîspa û Ara. 39 Û
lawên Ûlla: Arah û Hannîel û Rîtsya
bû. 40 Vana hemûyan lawên Aşer,
serokên malên bapîran, egîdên mêr-
xas ên bijartî, serokên began bûn. Û
hejmarên wan, li gor regezên wan
bona ku di cengê de xizmetê bikin
bîst û şeş hezar zilam bûn.

8 Û Benyamîn bû bavê lawê xwe
yî yekemîn Bela û lawê xwe
yî duwemîn Aşbel û lawê xwe yî
sêwemîn Aharah û 2 lawê xwe yî
çaremîn Noha û lawê xwe yî pên-
cemîn Rafa. 3 Û lawên Bela hebûn:
Addar û Gera û Abîhûd 4 û Abîşûa
û Naaman û Ahoah 5 û Gera û
Şefûfan û Hûram. 6 Û lawên Ehûd
wana ne: Vana serokên malên
bapîrên xwe ên ku li Gebayê rû-
dinin bûn û wan sirgûnî Manahatê
kirin 7 û Naaman û Ahiya û Gera;
ê ku wan sirgûn kirinbû viya bû û
bû bavê Ûzza û Ahîhûd. 8 Û paşî
ku Şaharahîm wan şand, li beyara
Moabê bû bavê zarokan: Hûşîm û

Baara jinên wî bûn. 9 Û ji jina xwe
Hodeşê, bû bavên Yobab û Tsîbya
û Meşa û Malkam 10 û Yeûts û
Şakya û Mîrma. Vana lawên wî,
serokên mala bapîran bûn. 11 Û ji
Hûşîmê bavê Abîtûb û Elpaal bû.
12 Û lawên Elpaal: Eber û Mîşam
û Şemedê ku Onoyê û tevî navçe-
yên wê Lod ava kirine 13 û Beriya
û Şemayê serokê malên bapîrên
ên ku li Ayyalonê rûdinin in; vana
yên ku li Gatê rûdinin revandin
14 û Ahyo, Şaşak û Yeremot 15 û
Zebadya û Arad û Eder 16 û Mi-
kael û Îşpa û Yoha, lawên Beriya
17 û Zebadya û Meşûllam û Hîzkî
û Heber 18 û Îşmeray û Îzliya û
Yobab, lawên Elpaal 19 û Yakîm û
Zîkrî û Zabdî 20 û Elîenay û Tsîl-
letay û Elîel 21 û Adaya û Beraya
û Şîmrat, lawên Şîmeyî 22 û Îşpan
û Eber û Eliyel 23 û Abdon û Zîk-
rî û Hanan 24 û Hananya û Elam
û Antotiya 25 û Îfdeya û Penûêl,
lawên Şaşak 26 û Şamşeray û
Şeharya û Atalya 27 û Yaareşya
û Eliya û Zîkrî, lawên Yeroham.
28 Serokên mala bapîran, li gor
nîjadên xwe, zilamên serok vana
bûn; li Orşelîmê rûniştin.

*Nîjada Qiral Saûl*

29 Û Yeîelê bavê Gîbeon, li Gîbe-
onê rûdinişt, navê pîreka wî Maaka
bû 30 û lawê wî yê yekemîn Abdon
û Tsûr û Kîş û Baal û Nadab 31 û
Gedor û Ahyo û Zeker. 32 Û Mîk-
lot bû bavê Şîmea. Û ew li hem-
berî birayên xwe, li Orşelîmê tevî
birayên xwe rûniştin. 33 Û Ner bû
bavê Kîş û Kîş bû bavê Saûl û Saûl
bû bavê Yonatan û Malkî-Şûa û
Abînadab û Eşbaal. 34 Û Merîb-
Baal lawê Yonatan bû û Merîb-
Baal bû bavê Mîka. 35 Û lawên
Mîka: Pîton û Melek û Tarea û
Ahaz. 36 Û Ahaz bû bavê Yehoad-
da û Yehoadda bû bavê Alemet û
Azmavet û Zîmrî û Zîmrî bû bavê
Motsa. 37 Û Motsa bû bavê Bî-
nea; lawê wî Rafa, lawê wî Eleasa,
lawê wî Atsel. 38 Û şeş lawên At-
sel hebûn, navên wan ev in: Azrî-
kam, Bokerû û Simayîl û Şearya û
Obadya û Hanan. Vana hemû
lawên Atsel bûn. 39 Û lawên
birayê wî Esek: Lawê wî yê
yekemîn Ûlam, yê duwemîn Yeûş
û yê sêwemîn Elîfelet. 40 Û lawên
Ûlam, egîdên tîrkêş û dilawêr bûn,
lawên wî û neviyên wî pirr bûn,
sed û pêncî. Vana hemû ji lawên
Benyamîn bûn.

*Yên ku ji Sirgûnê vedigerin Orşelîmê*
Neh 11

9 Û hemûya Îsraêlê, bi regezê ve
hatin jimartin û a vay, di pir-
tûka qiralên Îsraêlê de nivîsandî
ye. Û ji ber sûcên xwe, Cihûda
bi Babîlê ve hate sirgûnî kirin.
2 Û yên ku di milkên wan de, di
bajarên wan de pêşiyê rûniştine
Îsraêl, kahînan, Lêwiyiyan û

Netînîm bûn. 3 Û ji lawên Cihûda
û ji lawên Benyamîn û ji Efrayîm
û lawên Manaşşe, li Orşelîmê
rûniştin: 4 Ji lawên Peretsê lawê
Cihûda: Ûtayê lawê Ammîhûdê
lawê Omriyê lawê Îmriyê lawê
Banî. 5 Û ji Şiloyiyan: Lawê wî
yê yekem Asaya û lawên wî. 6 Ji
lawên Zerah: Yeûêl û birayên xwe,
şeş sed û nod. 7 Û ji lawên Ben-
yamîn: Sallûyê lawê Meşûllamê,
lawê Hodavyayê, lawê Hassenûa
8 û Îbneyayê lawê Yeroham û
Elayê lawê Ûzziyê, lawê Mîkrî û
Meşûllamê lawê Şefatyayê, lawê
Reûelê, lawê Îbniya 9 û li gor nî-
jadên xwe, birayên wî, neh sed
û pêncî û şeş kes li wir rûniştin.
Vana hemûyan li gor malên
bapîrên xwe, zilamên seriyên
malên bapîran bûn.

10 Û ji kahînan: Yedaya û
Yehoyarîb û Yakîn 11 û Azaryayê
lawê Hîlkiyayê, lawê Meşûllamê,
lawê Tsadokê, lawê Merayotê,
lawê Ahîtûbê serokê mala Xwe-
dê 12 û Adayayê lawê Yerohamê,
lawê Paşhûrê, lawê Malkiya û
Maasayê, lawê Adîelê, lawê Yah-
zerayê, lawê Meşûllamê, lawê
Meşîllemîtê, lawê Îmmer 13 û bi-
rayên wan, serokên malên bapîran,
hezar û heft sed û şêst; bona karê
xizmeta mala Xwedê egîdên zehf
mêrxas[1] bûn.

14 Û ji Lêwiyiyan: Ji lawên
Merarî, Şemayayê lawê Haşşûbê,
lawê Azrîkamê, lawê Haşabya
15 û Bakbakkar, Hereş û Galal û
Mattanyayê lawê Mîkayê, lawê
Zîkriyê, lawê Asaf 16 û Obadya-
yê lawê Şemayayê, lawê Galalê,
lawê Yedûtûn û Berekyayê lawê
Asayê û lawê Elkanayê ku li gun-
dên Netofayiyan rûdinişt.

17 Û dergevanan: Şallûm û Akkûb
û Talmon û Ahîman û birayên
wan; Şallûm serî bû 18 û yên
heta niha, berbi rojhilatê li deriyê
qiral disekinin, vana dergevanên
qonaxê ên lawên Lêwî bûn.
19 Û Şallûmê lawê Koreyê lawê
Ebyasafê lawê Korah û birayên
wî, ên ji mala bavê wî bûn,
Korahiyan, li ser karê xizmetê,
notirvanên şemûgên çadiran bûn û
bapîrên wan, li ser qesra XUDAN,
bûbûn notirvanên cîhê ketinê.
20 Û pêşiyê Pînehasê lawê
Eleazar, li ser wan serok bû û
XUDAN bi wî re bû. 21 Di deriyê
Çadira Civandinê de Zekaryayê
lawê Meşelya dergevan bû.
22 Hemû vana, ên ku bona li
şemûgan bibin dergevan hatine
bijartin du sed û donzdeh kes
bûn. Ew li gundên xwe, li gor
regezên xwe nivîsandîne; Dawid
û Samûyêlê Dibîne vana danîbûn
wezîfeyên wan. 23 Û vana û
lawên wan bi dor li deriyên mala
XUDAN, mala Çadirê dinêriyan.

---

1 Dilawêr, an jî: Cesûr.

24 Berbi rojhilat, rojava, bakur
û başûr, li çar aliyê wê dergevan
hebûn. 25 Û birayên wan ên li
gundên wan bûn, bona ku bi
heft rojan bi wan re bin, dem
bi dem dihatin; 26 ji ber ku çar
dergevanên serekên Lêwiyî, li
wezîfê bûn û li xezîne û odeyên
mala Xwedê dinihêrtin. 27 Û şevê
li dora mala Xwedê diman, ji ber
notirvaniya wê li ser wan bû û ji
sibehê heta sibehê vekirina wê
karên wan bû.
28 Û yên ku li taximên xizmetê di-
nihêrtin ji wan bûn; ji ber ku vana bi
hejmarê dianîn hundir û bi hejmarê
derdixistin derve. 29 Û yên ku li
ser pertalan[1] û li ser hemû feraxên
cîhên herî pîroz û li ser arvanê zi-
rav û xemr û rûn û gunuk û biha-
ratê hatine wezîfedar kirin ew bûn.
30 Û yên ku biharatê tevlihev dikirin
û amade dikirin ji lawên kahîn bûn.
31 Û ji Lêwiyiyan Mattîtyayê lawê
yekemîn yê Şallûmê Korahî ye, li
ser wezîfa karên tawe bû. 32 Û yên
li nanê aramiyê yê ku ji Sebtê heta
Sebtê tête amade kirin dinihêrtin, ji
lawên Kohatî, ji birayên wan bûn.
33 Û vana qesîdevanan, serokên
malên bapîrên Lêwiyiyan in; wekî
din xizmetekî nedidîtin û di ode-
yan de rûdiniştin; ji ber ku bi şev
û roj ji wan re kar hebû. 34 Li gor
nîjadên xwe vana serekên malên
bapîrên Lêwiyiyan; zilamên
wanî serî bûn; vana li Orşelîmê
rûdiniştin.

*Nîjada Qiral Saûl û Yonatan*

35 Û li Gîbeonê, bavê Gîbeon
Yeîel rûdinişt, navê pîreka wî
Maaka bû 36 û lawê wî yê yekem
Abdon bû û Tsûr û Kîş û Baal û
Ner û Nadab 37 û Gedor û Ahyo û
Zekarya û Mîklot. 38 Û Mîklot
bû bavê Şîmeam. Ew jî li hem-
berê birayên xwe, li Orşelîmê tevî
birayên xwe rûdiniştin. 39 Û Ner
bû bavê Kîş û Kîş bû bavê Saûl û
Saûl bû bavê Yonatan û Malkî-Şûa
û Abînadab û Eşbaal. 40 Û Merîb-
Baal lawê Yonatan bû û Merîb-
Baal bû bavê Mîka. 41 Û lawên
Mîka: Pîton û Melek û Tahrea û
Ahaz. 42 Û Ahaz bû bavê Yara û
Yara bû bavê Alemet û Azmavet
û Zîmrî û Zîmrî bû bavê Motsa
43 û Motsa bû bavê Bînea û lawê
wî Refaya, lawê wî Eleasa, lawê wî
Atsel. 44 Û şeş lawên Atsel hebûn;
navên wan vana ne: Azrîkam, Bo-
kerû û Simayîl û Şearya û Obadya
û Hanan. Lawên Atsel vana bûn.

*Mirina Qiral Saûl*

1.Sam 31

10 Û Filistiyan li hemberî Îs-
raêlê cengê kirin û zilamên
Îsraêlê ji ber Filistiyan reviyan û
yên ku hatibûn lêxistin, di çiyayê
Gîlboayê de ketin. 2 Û Filistiyan

[1] Alavan.

bi pêy Saûl û lawên wî ve zeliqîn
û Filistiyan li lawên Saûl; Yonatan
û Abînadab û Malkî-Şûa xistin.
3 Û li hember Saûl ceng dijwar
bû û tîrvanan wî dîtin û ji tîrva-
nan aciz bû. 4 Û Saûl ji çekvanê
xwe re got: Şûrê xwe bikişîne û
wê bi min ve daçikilîne, ya na dê
ev yên bêsunet werin û qerfikên
xwe bi min re bikin! Lê belê çek-
vanê wî nexwest ku bike; ji ber
ku zehf tirsiya. Û Saûl şûrê xwe
rahişt û bi ser wê ve ket. 5 Û dema
çekvanê wî dît ku Saûl mir, ew
bi xwe jî ket ser şûrê xwe û mir.
6 Bi vî awayî Saûl û her sê lawên
xwe mirin û hemûya mala wî pev
re mirin.
7 Û hemû Îsraêliyên ku li newalê
ne, dema reva wan û mirina Saûl
û lawên wî dîtin, bajarên xwe
berdan û reviyan û Filistî hatin
û di wan de rûniştin. 8 Û dotira
rojê wusa bû ku, dema Filistiyan,
bona yên ku kuştine tazî bikin ha-
tin, dîtin ku Saûl û sê lawên wî li
çiyayê Gîlboa ketine. 9 Û wî tazî
kirin û serê wî û çekên wî rahiştin
û bona ku mizgîniyê ji pûtên xwe
re û ji netewê re bibin, bi dorûber
şandin welatê Filistiyan. 10 Û
çekên wî danîn mala îlahê xwe
û serê wî di hundirê mala Dagon
de kutan. 11 Û hemûya Yabeş-
Gîlead dema hemûya tiştên ku
Filistiyan bi Saûl ve kirine bihîs-
tin, 12 hemûyên egîdan rabûn û
cesedê Saûl û cesedên lawên wî
rakirin û anîn Yabeşê û hestiyên
wan di bin darê çilo de, ya ku li
Yabeşê ye binax kirin û heft roj
rojiyê girtin.
13 Bi vî awayî Saûl ji ber sûcê
ku li dijî XUDAN kiriye, ji ber
gotina XUDAN ya ku negirtiye
mir; him jî bi cinvan re bona ku
bişêwire, jê şîretan pirsî 14 û bi
XUDAN neşêwirî û XUDAN wî
kuşt û berê qiraletiyê berbi Dawi-
dê lawê Îşay ve zivirand.

*Dawid dibe Qiralê Îsraêlê*

2.Sam 5,1-10

11 Û hemûya Îsraêlê li Heb-
ronê, li cem Dawid civiyan
û gotin: A vay, em hestiyê te û
goştê te ne. 2 Di demên derbasbûyî
de, dema Saûl qiral bû jî, yê ku Îs-
raêlê derdixist derve û dianî hundir
dîsa tu bû û Xwedayê te XUDAN ji
te re got: Tuyê netewa min, Îsraêlê
bajo û tuyê li ser netewa min Îsraêlê
bibe serwer. 3 Û hemû kalepîrên Îs-
raêlê li Hebronê, hatin cem qiral û
Dawid li Hebronê, li ber XUDAN
bi wan re peymanê danî û li gor
gotina XUDAN ya ku bi navdîtiya
Samûyêl e, Dawid li ser Îsraêlê bi
qiraletiyê mesh kirin.
4 Û hemûya Îsraêlê bi Dawid re
çûn Orşelîmê, ew Yebûs e û Yebû-
siyan, ên ku li welêt rûdiniştin,
li wir bûn. 5 Û yên ku li Yebûsê
rûdinin ji Dawid re gotin: Tuyê

nekeve vê derê! Lê belê Dawid
birca Sîonê bi dest ve xist; ba-
jarê Dawid ev der e. 6 Û Dawid
got: Her kî ku pêşiyê li Yebûsiyan
bixe, dê ew bibe serok û sermi-
yan. Û pêşiyêYoabê lawê Serûya
derket û ew bû serok. 7 Û Dawid
li bircê rûnişt, ji ber vê yekê jê re
gotin bajarê Dawid. 8 Û ji Mîl-
loyê, heta cîhên ku li dora wê ne,
bi dorûberî bajêr çêkir. Û Yoab,
ya ji bermayiya bajêr tamîr kir.
9 Û Dawid her ku diçû mezin
dibû; ji ber ku XUDANê artêşan
bi wî re bû.

*Leşkerên Dawid ên Mêrxas*
2.Sam 23,8-39; 1.Dîr 27,1-15

10 Û li gor gotina XUDAN ya
bona Îsraêlê ye, serokên egîdên
Dawid, ên ku bona Dawid bikin
qiral, bi wî re û bi hemûya Îsraêlê
re hêz dayîne xuya kirin vana ne.
11 Û hejmara egîdên Dawid vêya
ye: Lawê Hakmonî, serokê Sîhan,
Yaşobeam; li hemberî sê sedî
rimê xwe hilda û wan di carekî de
kuşt. 12 Û paşî wî, Elezarê Alo-
hiyê lawê Dodoyê ku ji sê egîdan
yek e. 13 Ê ku li Pas-Dammîmê
bi Dawid re bû ew bû û Filistî,
bona cengê li wir civiyabûn û li
wir pariyek zevî ê ku bi ceh ve tijî
ye hebû û netewe ji ber Filistiyan
reviyan. 14 Û ew di nava pariyê
zeviyê de sekinîn û wê parastin û
li Filistiyan xistin û XUDAN bi
xelasiyek mezin wan xelas kir.
15 Û ji Sîhên serî sisê daketin
zinarê, cem Dawid, şikefta Adûl-
lamê û artêşa Filistiyan di çemê
Refaîmê de artêşgehê danîbû.
16 Û Dawid wê gavê li bircê bû
û leşkerê Filistiyan wê gavê li
Beytlehemê bû. 17 Û Dawid bêrî
kir û got: Xwezîka yek ji bîra ku
li Beytlehemê li ber derî ye, avê
bide min[1]! 18 Û van her sisêyan
artêşa Filistiyan qelişandin, ji bîra
Beytlehemê ya ku li ber derî bû
avê kişandin û wê rahiştin û ji
Dawid re anîn; lê Dawid jî ne-
xwest ku wê vexwe û wê wekî
pêşkêşiyekê ji XUDAN re rijand
19 û got: Kirina vêya bila Xwedê
ji min ve dûr bike; ma ez xwîna
van zilamên ku canê xwe avêti-
ne xeterê vexwim? Ji ber ku wê
bi bihayiya canê xwe anîn. Bo vê
yekê nexwest ku wê vexwe. Sê
egîdan van tiştan kirin.
20 Û Abîşayê birayê Yoab serokê
Sisêyan bû û li hember sê sed kesî
rimê xwe rakir û wan kuşt û di nav
Sisêyan de navê wî hebû. 21 Rêza
duwem ji sisêyan yê herî birêz bû
û bû serokê wan; lê belê negîhaşt
Sisêyên yekemîn.
22 Benayayê ku lawê zilamekî
Kabtseêyî dilawêr, yê lawê
Yehoyada ye û karên xwurt çêki-
riye, li her du lawên Arîêlê Moabî

[1] An jî: Bi min ve bide vexwarin!

xist û rojekî berfê daket kortalê û
li şêrekî xist. 23 Û Misiriyekî qam
dirêj e, zilamekî di dirêjiya pênc
geziye[1] de xist û di destê yê Misirî
de, rimekî mîna mircaqa çilagê
hebû û bi ço daket cem wî û rimê
ji destê yê Misirî rahişt û kişand
û bi rima wî, wî kuşt. 24 Bena-
yayê lawê Yehoyada vana kir û
di nav sê egîdî de navê wî hebû.
25 A vay, ji Sîhan hîn jî birûmettir
bû, lê belê negîhaşt Sêweminên
pêşîn. Û Dawid wî danî serê pa-
rastkiran.

26 Û egîdên artêşan: Asahelê bi-
rayê Yoab, Elhananê lawê Dodoyê
Beytlehemî, 27 Şammotê Harorî,
Heletsê Pelonî, 28 Îrayê lawê
Îkkeşê Tekoayî, Abîezerê Ana-
totî, 29 Sîbbekayê Hûşayî, Îlayê
Ahohî, 30 Maharayê Netofayî,
Heledê lawê Baanayê Netofayî,
31 ji lawên Benyamîn, Îtayê lawê
Rîbayê Gîbeayî, Benayayê Pîra-
torî, 32 Hûrayê ji newalên Gaaşê,
Abîelê Arbayî, 33 Azmavetê
Baharûmî, Elyahbayê Şaalbonî,
34 lawên Haşemê Gîzonî, Yo-
natanê lawê Şageyê Hararî,
35 Ahîamê lawê Sakarê Hararî.
Elîfalê lawê Ûr, 36 Heferê Meke-
rayî, Ahiyayê Pelonî, 37 Hetsroyê
Karmelî, Naarayê lawê Ezbay,
38 Yowêlê birayê Natan, Mîbharê
lawê Hagrî, 39 Tselekê Ammonî,
çekdarê Yoabê lawê Serûya,
Naharayê Berotî, 40 Îrayayê Yîtrî,
Garebê Îtrî, 41 Ûriyayê Hîttî, Za-
badê lawê Ahlay, 42 Adînayê lawê
Şîzayê Rûbenî, serokek Rûbeni-
yan û tevî wî sîh kes, 43 Hananê
lawê Maaka û Yoşafatê Mîtînî,
44 Ûzziyayê Aşterayî, Şama û
Yeîelê lawên Hotamê Aroerî,
45 Yedîaelê lawê Şîmrî û birayê
wî Yohayê Tîtsî, 46 Elîelê Ma-
havî û lawên Elnaam Yerîbay û
Yoşavya û Îtmayê Moabî, 47 Elîel
û Obêd û Yaasîelê Metsobayî.

*Alîkarên Dawid ên Zîklagê*

12 Û hîn ku Dawid ji ber
Saûlê lawê Kîş xwe
vedişart, ên ku hatine Zîklagê,
cem wî vana ne û ew di nav egî-
dan de, di cengê de alîkarên wî
bûn. 2 Vana ji Benyamînê, ji bi-
rayên Saûl, ên ku tîrê dikişandin
bûn, di avêtina kevir de û bi
kevanê avêtina tîrê de, bi de-
stên xwe yî rast û çepê zilamên
hînbûyî bûn. 3 Serî Ahîezer bû
û Yoaş, lawên Şemaanê Gîbeatî
û Yezîel û Pelet, lawên Azma-
vet û Beraka û Yehûyê Anatotî
4 û Îşmayayê Gîbeonî yê ku ji
Sîhan yek e, lê belê bi ser Sîhan
ve ketiye û Yêremya û Yahazîel
û Yohanan û Yozabadê Gedera-
yî, 5 Elûzay û Yerîmot û Bealya
û Şemarya û Şefatyayê Harûfî,
6 Elkana û Îşşiya û Azarel û Yoe-

1 Li rasteka menan binêrin.

zer û Yaşobeam, Korahiyan 7 û
Yowêla û Zebadya, ji Gedorê
lawên Yeroham.
8 Û ên ku ji Gadiyan qetiyan û
hatin cem Dawid, hatin birca ku
li çolê ye, egîdên dilawêr ên ku
bi cengê ve hîn bûne û dikarin
bi mertal û rima mezin bileyîzin
bûn; wecê wan mîna şêran bû û
di bazdanê de, mîna xezalên ku li
ser çiyayan e bûn: 9 Serî Ezer, du-
wemîn Obadya, sêwemîn Elîab,
10 çaremîn Mîşmanna, pêncemîn
Yêremya, 11 şeşemîn Attay, hef-
temîn Elîel, 12 yê heyştan Yo-
hanan, yê nehan Elzabad, 13 yê
dehan Yêremya, yê yanzdehan
Makbannay bû. 14 Vana ji lawên
Gad, ên ku serê artêşan bûn; yê
herî biçûk hêjayî sed zilamî û yê
herî mezin e, hêjayî hezar zilamî
bûn. 15 Di meha yekemîn de hîn
Urdun bi hemû hêlên[1] xwe ve
rabûbû, ên ku ji wê derbas bûne
vana ne û hemûyên ku di newalan
de rûdinin berbi rojhilat û roja-
vayê qewirandin.
16 Ji lawên Benyamîn û Cihûda jî
hatin cem Dawid, bircê. 17 Û Da-
wid bona pêrgîniya wan derket û
bersivê da û ji wan re got: Ger hûn
bona ku alîkariyê bi min re bikin,
bi aştiyê hatibin, dê dilê min bi
we re bibe yek; lê belê çawa ku
di destên min de zordestî nîne û
hûn, bona ku min bidin destên
neyarên min hatibin, bila Xwe-
dayê bapîrên me vê yekê bibîne
û cezayê wê bide! 18 Û Ruh hate
ser Amasayê ku serokê Sîhan e û
wî got: Ya Dawid, em yê te ne û
ya lawê Îşay, em bi te re ne! Silav,
ji te re silav û bila ji yên ku alî-
kariyê bi te re dikin re silav bibe!
Ji ber ku Xwedayê te alîkariyê bi
te re dike! Û Dawid wan rahişt û
wan kir serên nijdê[2].
19 Dema Dawid tevî Filistiyan,
bona ku cengê bike hat hemberê
Saûl, ji Manaşşe jî hin kes derbasî
aliyê Dawid bûn; lê belê alîkariyê
bi Filistiyan re nekirin; ji ber ku
efendiyên Filistiyan di nav xwe
de şîretan dan hev û bi gotina:
Dê Dawid serokê me bifroşe û
derbasî efendiyê xwe Saûl bibe!
wî ji cem xwe şandin. 20 Dema
Dawid diçû Zîklagê, Adna û
Yozabad û Yedîael û Mîkael û
Yozabad û Elîhû û Tsîlletayê ku
li Manaşşeyê serokê hezaran in, ji
Manaşşeyê derbasî aliyê wî bûn.
21 Û li dijî nijdeyan vana alîka-
riyê bi Dawid re kirin; ji ber ku
hemû egîdên dilawêr bûn û di
artêşê de fermandar û serpêl bûn.
22 Ji ber, bona ku alîkariyê bi Da-
wid re bikin, heta ku artêşek me-
zin ya qasî artêşa Xwedê bibe, roj
bi roj dihatin cem wî.

1 Qerax.

2 Êrîşker.

*Artêşa Dawid ya li Hebronê*

23 Û li gor gotina XUDAN, bona ku qiraletiya Saûl berbi Dawid ve bizivirîne hejmara serokên çekdar ên ku hatine cem wî, Hebronê, vana ne. 24 Lawên Cihûda ên ku rim û mertalên mezin bi wan re ne, şeş hezar û heyşt sed kesê ku bona cengê çekan hildane. 25 Ji lawên Şîmeûn, bona cengê egîdên dilawêr heft hezar û sed kes. 26 Ji lawên Lêwî çar hezar û şeş sed kes. 27 Û Yehoyada serokê mala Harûn bû û tevî wî sê hezar û heft sed kes 28 û Tsadokê egîd, xort û dilawêr û ji mala bapîrên wî bîst û du serok hebûn. 29 Û ji lawên Benyamîn ên ku birayê Saûl in, sê hezar kes; ji ber ku heta wê çaxê, gellekên wan ji mala Saûl re dilsoz mabûn. 30 Û ji lawên Efrayîm bîst hezar û heyşt sed kes, egîdên dilawêr, zilamên ku di mala bapîrên wan de navên wan tête bîranîn. 31 Û hîjdeh hezar kesên ku ji nîv nîjada Manaşşe hatine û bona ku Dawid bikin qiral, bi navê xwe tên nîşan dayîn. 32 Û ji lawên Îsşakar ên ku bona ka dê Îsraêl çi bike bizanibin, di fêhmkariya deman de zaniyar in; serokên wan du sed kes bûn û hemû birayên wan li devên wan dinihêrtin. 33 Ji Zebûlûnê pêncî hezar kesên ku bi hemû haletên cengê ve derketine artêşê, ên ku dikarin duzena cengê deynin û ne bi du dilî ne û di cengê de rêz dibin. 34 Û ji Naftaliyê hezar serok û tevî wan, bi rim û mertala mezin sîh û heft hezar kes. 35 Û ji Daniyan bîst û heyşt hezar û şeş sed kesên ku dikarin dûzena cengê deynin. 36 Û yên ku ji Aşerê derketine cengê, dikarin dûzena cengê deynin çel hezar kes. 37 Û ji Urdunê wêdetir ji Rûbeniyan û ji Gadiyan û ji nîv nîjada Manaşşe, bona cengê, bi her celebî haletên cengê sed û bîst hezar kes.

38 Hemûyên vana, zilamên cengê, ên ku di cengê de rêz dibin, bona ku Dawid li ser hemûya Îsraêlê bikin qiral, bi hemûya dil hatin Hebronê û hemûya li pêy mayiyên Îsraêlê jî, bona ku Dawid bikin qiral, dilên wan yek bûn. 39 Û li wir, sê rojan bi Dawid re man û xwarin û vexwarin; ji ber ku birayên wan bona wan amadekariyê kiribûn. 40 Û heta ku bigihêje Îsşakarê û Zebûlûnê û Naftaliyê, ên ku nêzîkî wan bûn û li ser keran û deveyan û qantiran û ganêran nan, xwarinên karê hevîr, hêjîrên dewisandî û goşiyên mewîjan û xemr û rûn û pirr ga û mîhan anîn; ji ber ku li Îsraêlê kêfxweşî hebû.

*Sindoqa Peymanê ji Kîryat-Yearîmê tête kişandin*

13 Û Dawid bi serokên hezaran û sedan, bi her serokî re şêwirî. 2 Û Dawid ji hemûya civaka Îsraêlê re got: Ger ji we re

qenc were xuyanî kirin û ev kar,
ji Xwedayê me XUDAN be, em
ji derve, ji her alî re, ji hemû bi-
rayên xwe ên ku di hemû welatên
Îsraêlê de mane û tevî wan ji kahîn
û Lêwiyiyên ku di bajarên xwe
yî çêregehan de mane re bişînin
ku bila li cem me bicivin 3 û em
Sindoqa Xwedayê xwe ji xwe re
bînin; ji ber ku em di rojên Saûl
de li wê negeriyan! 4 Û hemûya
civakê: Em ê wusa bikin, gotin; ji
ber ku di çavê hemûya netewê de
ev kar rast bû. 5 Û bona ku Sin-
doqa Xwedê ji Kîryat-Yearîmê
bîne, Dawid ji Şîhora newala
Misirê, heta cîhê ketina Hamatê,
hemûya Îsraêlê civandin. 6 Û
Dawid tevî hemûya Îsraêlê, Sin-
doqa XUDAN, Xwedayê ku li
ser kerûbiyan rûdine, Sindoqa
wî ya ku bi nav tête bang kirin, ji
Baalayê, ji Kîryat-Yearîma Cihû-
dayê derxîne, hilkişiya wir. 7 Û
Sindoqa Xwedê li erebeyekî nû
siwar kirin û ji mala Abînadab
derxistin û Ûzza û Ahyo erebê
diajotin. 8 Û hemûya Îsraêlê, tevî
Dawid, bi qesîdeyan û bi çenkan
û bi santûran û bi tefan û bi zîlan
û bi boriyan li ber Xwedê bi hemû
quweta xwe lîstin.
9 Û hatin cîhê bêndera Kîdon û
Ûzza, bona ku Sindoqê bigire des-
tê xwe dirêj kir; ji ber ku ga til-
pekî bûbûn. 10 Û li dijî Ûzza
hêrsa XUDAN sor bû û lê xist,
ji ber ku destê xwe bi ser Sindo-
qê ve dirêj kiribû û li wir, li ber
Xwedê mir. 11 Û Dawid hêrs bû,
ji ber ku XUDAN li Ûzza xistibû
û ji wê derê re Perets-Ûzza[1] got
û heta îroj wusa tête gotin. 12 Û
Dawid wê rojê ji Xwedê ve tirsiya
û got: Ma ez çawa Sindoqa Xwe-
dê bînim cem xwe? 13 Û Dawid
Sindoqê nebir cem xwe bajarê
Dawid, lê belê Dawid berê wê da
ber bi mala Obêd-Edomê Gatî.
14 Û Sindoqa Xwedê li mala wî,
tevî maliyên Obêd-Edom sê meh
ma û XUDAN mala Obêd-Edom
û her tiştên wî bi berdarî kirin.

*Malbata Dawid*

2.Sam 5,11-25

14 Û Hîramê qiralê Sûrê, ji
Dawid re şandiyan û bona
ku xanî ava bike darên erzê û hos-
teyên dîwaran û xeratan şand. 2 Û
Dawid fêhm kir ku XUDAN li ser
Îsraêlê bi qiraletî wî zeximandiye;
ji ber ku bona xatirê netewa xwe
Îsraêlê qiraletiyê bilind kiribû.
3 Û Dawid, li Orşelîmê dîsa jinikan
girt û dîsa bû bavê lawan û qîzan.
4 Û navên yên ku li Orşelîmê jê re
bûyîne ev in: Şammûa û Şobab,
Natan û Silêman 5 û Îhbar û
Elîşûa û Elpelet 6 û Noga û Nefeg
û Yafîa 7 û Elîşama û Beelîada û
Elîfelet.

[1] Neqeba Ûzza.

8 Û Filistiyan bihîstin ku Dawid
li ser Îsraêlê bi qiraletî hatiye
mesh kirin û hemûyên Filistiyan
bona ku li Dawid bigerin derke-
tin û Dawid bihîst û derket pêşiya
wan. 9 Û Filistiyan hatibûn û êrîşî
çemê Refaîmê kiribûn. 10 Û Da-
wid ji Xwedê ve pirsî û got: Gelo
ez li dijî Filistiyan derkevim? Û
gelo tuyê wan bide destê min? Û
XUDAN jê re got: Derkeve û ez ê
wan bidim destê te! 11 Û derketin
Baal-Peratsîmê û Dawid li wir, li
wan xist û Dawid got: Mîna ku av
bendan dişkînin, Xwedê bi destê
min neyarên min şikenand. Bo vê
yekê navê Baal-Peratsîmê[1] li wir
kirin. 12 Û îlahên xwe li wir hiştin
û Dawid emir da û ew di agir de
hatin şewitandin.
13 Û Filistiyan li wê newalê ca-
rekî din êrîş kirin. 14 Û Dawid
dîsa ji Xwedê ve pirsî û Xwedê jê
re got: Tuyê ji pêş wan dernekeve;
ji wan vegere û li hemberî darên
tûyê bi ser wan ve were. 15 Û dê
wusa bibe ku dema tu li ser darên
tûyê dengê meşê bibihîze, tuyê
wê gavê derkeve cengê; ji ber ku
Xwedê di pêşiya te de, bona ku
li artêşa Filistiyan bixe derketi-
ye. 16 Û Dawid, mîna ku Xwe-
dê emir daye wî, kir û ji Gîbeonê
heta ku bigihêje Gezerê li artêşa
Filistiyan xist. 17 Û navê Dawid,
li hemûyên welatan belav bû û
XUDAN tirsa Dawid li hemû ne-
teweyan gerand.

*Sindoqa Peymanê tînin Orşelîmê*
2.Sam 6,12.23

15 Û Dawid bona xwe, li ba-
jarê Dawid xaniyan ava kir
û bona Sindoqa Xwedê cîh amade
kir û bona wê çadirê danî. 2 Wê
gavê Dawid got: Xeynî Lêwiyi-
yan kes nikare Sindoqa Xwedê
bikişîne; ji ber, bona kişandina
Sindoqa Xwedê û bona ku abadîn
xizmetê ji wan re bike, XUDAN
wan hilbijart. 3 Û Dawid, bona ku
Sindoqa XUDAN hilkişîne cîhê
ku jê re amade kiriye, hemûya
Îsraêlê li Orşelîmê civand. 4 Û
Dawid lawên Harûn û Lêwiyiyan
civandin: 5 Ji lawên Kohat, serok
Ûrîel û birayên wî, sed û bîst kes;
6 ji lawên Merarî, serok Asaya
û birayên wî, du sed û bîst kes;
7 ji lawên Gerşom, serok Yowêl
û birayên wî; sed û sîh kes; 8 ji
lawên Elîtsafan, serok Şemaya û
birayên wî, du sed kes, 9 ji lawên
Hebron, serok Elîêl û birayên wî,
heyştê kes, 10 ji lawên Ûzzîel
serok Ammînadab û birayên wî,
sed û donzdeh kes. 11 Û Dawid
bangî kahînan, Tsadok û Abîatar û
Lêwiyiyan Ûrîel, Asaya û Yowêl,
Şemaya û Elîêl û Ammînadab kir
12 û ji wan re got: Hûn Lêwiyi-
yan, hûn serokên mala bapîra

1 Cîhê Neqeban.

ne; hûn û birayên we, xwe pîroz
bikin û Sindoqa XUDAN Xwe-
dayê Îsraêlê hilkişînin cîhê ku ji
bo wê amade kirime! 13 Ji ber,
bona ku cara din we nekişand,
em jî li gor ûsilê, li wê negeriyan,
Xwedayê me XUDAN li me xist.
14 Û bona ku Sindoqa Xwedayê
Îsraêlê XUDAN hilkişînin kahîn-
an û Lêwiyiyan xwe pîroz kirin.
15 Û li gor gotina XUDAN, mîna
ku Mûsa emir daye, lawên Lêwî
destiyên Sindoqa Xwedê dan ser
milên xwe û wê kişandin.
16 Û Dawid, ji serokên Lêwiyi-
yan re got ku bila qesîdevanên ku
li haletên mûsikiyê, santûr, çenkan
û zîlan lêdixin û bi kêfxweşiyê ve
deng bilind dikin, bila ji nav bi-
rayên xwe hilbijêrin. 17 Û Lêwi-
yiyan, Hemanê lawê Yowêl û ji
birayên xwe Asafê lawê Berekya
û ji birayên xwe lawên Merarî ve
Eytanê lawê Kûşaya 18 û tevî vana
ji birayên xwe yî çîna duwemîn
in dergevanan, Zekarya, Ben û
Yaazîêl û Şemîramot û Yehîel û
Ûnnî û Elîab û Benaya û Maaseya
û Mattiya û Elîfelehû û Mîkneya
û Obêd-Edom û Yeîel tayîn ki-
rin. 19 Û qesîdevanan, Heman û
Asaf û Eytan bi zîlên tûnc yên ku
dengê bilind derdixin 20 û Zekar-
ya û Azîel û Şemîramot û Yehîel û
Ûnnî û Elîab û Maaseya û Benaya
bi ser Alamotê bi santûran 21 û bi
ser Mattîtya û Elîfelehû û Mîkneya
û Obêd-Edom û Yeîel û Azazya bi
ser Şemînît ve bona ku bi çenkan
rêberiyê bikin hatin wezîfedar ki-
rin. 22 Û di karê birinê de Kenan-
yayê ku serokê Lêwiyiyan e, di
birinê de fêrmend bû, ji ber ku bi
fêhmkarî bû. 23 Û Berekya û El-
kana ji Sindoqê re dergevan bûn.
24 Û Şebanya û Yoşafat û Neta-
nel û Amasay û Zekarya û Benaya
û Elîezer, kahînan li ber Sindoqa
Xwedê li boriyê dixistin û Obêd-
Edom û Yehiya ji Sindoqê re der-
gevan bûn.
25 Û bona ku bi kêfxweşiyê Sin-
doqa XUDAN ya Peymanê ji
mala Obêd-Edom derxînin Da-
wid û kalepîrên Îsraêlê û serokên
hezaran çûn. 26 Û wusa bû ku, dema
Xwedê alîkariyê bi Lêwiyiyên ku
Sindoqa Peymanê ya XUDAN di-
bin re kir, heft ga û heft beranî qur-
ban kirin. 27 Û Dawid cubbeyek
spî ji kitana zirav li xwe kiribû û
hemû Lêwiyiyên ku Sindoqê di-
bin û qesîdevan û Kenanyayê ku li
ser karê kişandinê ye jî wusa bûn;
li ser Dawid, efoda kitan jî hebû.
28 Û hemûya Îsraêlê bi qêrînê û bi
pifkirina zirnê û bi borî û zîlan û bi
lêxistina çenk û santûrên ku dengê
bilind derdixin, Sindoqa Peymanê
ya XUDAN derxistin.
29 Û wusa bû ku dema Sindoqa
Peymanê ya XUDAN hate bajarê
Dawid, Mîkala qîza Saûl ji şivakê
ve nihêrt û qiral Dawid di reqsa

holbûnê de dît û di dilê xwe de wî
biçûk dît.

16 Û Sindoqa Xwedê anîn
hundir û wê danîn nava
çadira ku Dawid ji bo wê ava ki-
riye û li ber Xwedê pêşkêşiyên
şewitandinê û yên xweşiyê
pêşkêş kirin. 2 Û gava Dawid,
pêşkêşîkirina pêşkêşiyên şewitan-
dinê û yên xweşiyê qedandin, bi
navê XUDAN netewê pîroz kir.
3 Û ji Îsraêlê ji her kesî re ji mêr
û jin ji her kesî re nanekî somî û
pariyekî goşt û pîdeyek mewîjan
belav kirin.
4 Û bona ku li ber Sindoqa XU-
DAN xizmetê bikin û bîranîna[1]
Xwedayê Îsraêlê XUDAN bikin û
jê re şikirî û hemdê bikin, ji Lêwi-
yiyan zilaman danîn: 5 Serok Asaf
û yê duwemînê wî Zekarya, Yeîel
û Şemîramot û Yehîel û Mattîtya
û Elîab û Benaya û Obêd-Edom û
Yeîel, bi santûran û çenkan; Asaf
jî bi zîlên ku dengê bilind derdi-
xin 6 û kahîn Benaya û Yahazîêl,
her tim bi boriyan li ber Sindoqa
Xwedê ya Peymanê bûn.

*Murxa Dawid ya Şikirkirinê*

Zeb 105; 96; 106,47-48

7 Wê gavê Dawid, cara pêşîn wê
rojê bona ku şikiryê ji XUDAN re
bike, karê xwe da destên Asaf û
birayên wî:
8 Şikiryê ji XUDAN re bikin,
bangî navê wî bikin; di nava nete-
wan de karên wî bidin bihîstin[2]!
9 Jê re qesîdeyan bixwînin, jê re
bistirên; hemû nuwazeyên wî bi-
bêjin!
10 Bi navê wî yê pîroz pesnên
xwe bidin; bila dilên yên ku li
XUDAN digerin geş bibin!
11 Li XUDAN û li qudreta wî bi-
gerin; her tim li wecê wî bigerin!
12 Ya nîjada Îsraêla ku qûlê wî ye,
lawên Aqûp ên ku bijartiye!
13 Nuwazeyên ku çêkirine, mûcî-
zetên wî û daraziya devê wî di
bîra xwe de bînin!
14 Xwedayê me XUDAN ew e; da-
raziyên wî li hemûya rûyê erdê ne.
15 Abadîn peymana wî, gotina wî
ya heta hezar nifşeyî emir daye,
16 Peymana wî, ya ku bi Birahîm
re ye û sonda wî ya ku ji Îshaq re
ye, di bîra xwe de bînin!
17 Û bi gotina: Bona ku bibe para
mêrasa we, ez ê welatê Kenanê
bidim te.
18 Vêya bona ku bibe zagon ji
Aqûp re, wekî peymana abadîn ji
Îsraêl re danî.
19 Wê gavê ku, hûn bi hejmarî
hindik, zilamên ku zehf hindik û
li wir biyan bûn[3].

1 Bîraniya spasiya XUDAN.
2 An jî: Bang bikin.
3 An jî: Mêhvan.

20 Ji gel heta gelî, ji welatekî heta
netewekî din digeriyan.
21 Tu kesî bona ku xerabiyê bi
wan ve bikin nehiştin; di oxra wan
de heta bi qiralan ve jî pekiya:
22 Destê xwe bi yên ku mesh ki-
rime nedin û xerabiyê bi peyxam-
berên min ve mekin! got.
23 Ya hemûya dinê, qesîdeyan ji
XUDAN re bixwînin! Xelasiya
wî ji rojê heta rojê mizgînî bikin!
24 Mezintiya wî di nav gelan de,
nuwazeyên wî di nava hemû nete-
weyan de bang bikin!
25 Ji ber ku XUDAN mezin e û
liyaqî gellekî hemdê ye û ji hemû
îlahan hîn jî tirsehêz e.
26 Ji ber ku hemû îlahên nete-
weyan pût in; lê belê XUDAN
ezmanan afirand.
27 Bilindayî û mezinayî li ber wî
ne; qudret û kêfxweşî li cîhê ku
ew lê rûdinê ne.
28 Ya hûn, nîjadên neteweyan,
bidin XUDAN, mezintî û qudretê
bidin XUDAN!
29 Mezintiya navê wî bidin XU-
DAN; pêşkêşiyê bînin û werin ber
wî; di nava xemla pîroz de peris-
tinê ji XUDAN re bikin!
30 Ya hemûya dinê, li ber wî bile-
rizin! Dinya jî hatiye dameziran-
din, dê nehêje.
31 Bila ezmanan kêfxweş bibin,
erd jî bi kêfê bikeve! Û di nava
neteweyan de bila bête gotin:
XUDAN serweriyê dajo!
32 Bila behr û zîpikên wê bigur-
min! Beyar û yên tim tê de ne, bi
kêfxweşiyê bicoşin!
33 Wê gavê dê darên daristanê, li
ber XUDAN bi kêfxweşiyê bis-
tirên; ji ber, bona ku serweriyê ji
erdê re bike tê!
34 Şikiryê ji XUDAN re bikin, ji
ber ku ew qenc e; ji ber ku xêra
wî abadîn e!
35 Û bibêjin: Ya Xwedayê xelasi-
ya me, me xelas bike, bona ku ji
navê te yî pîroz re şikiryê bikin û
bona ku bi bilindayiya te re pes-
nahiyê bidin, me bide hev û me ji
gelan ve azad bike!
36 Bila Xwedayê Îsraêlê, XUDAN,
ji destpêkê heta abadînê pîroz be!
Û hemû netewe: Amîn! gotin û
hemdê ji XUDAN re kirin.

*Lêwiyê bona Sindoqa Peymanê têne wezîfedarkirin*

37 Û li wir li ber Sindoqa Peymanê
ya XUDAN, her roj, li gor karê
rojê, bona ku her tim li ber Sindo-
qê xizmetê bikin Asaf û birayên wî
38 û Obêd-Edom û birayên wan,
şêst û heyşt kesî û bi dergevanî
jî Obêd-Edomê lawê Yedûtun û
Hosa danîn 39 û li cîhê bilind yê
li Gîbeonê yî, li ber şunwara XU-
DAN, li ser pêşkêşîgeha pêşkêşiya
şewitandinê, 40 li gor heçiyên
zagona ku XUDAN ji Îsraêlê re
emir kiriye, her tim sibeh û êvarî,
bona ku ji XUDAN re pêşkêşiyên

şewitandinê pêşkêş bikin, kahîn
Tsadok û birayên kahîn 41 û ji ber
ku xêra wî abadîn e, bona şikiryê
ji XUDAN re bike, tevî wan He-
man û Yedûtûn û yên ji bermayi-
yên kesên hatine hilbijartin ên ku
bi navê xwe ve tên bîranîn danîn
42 û boriyan, zîlan û bona qesî-
deyên Xwedê haletên mûsikiyê
dan yên ku dengê bilind derdixin,
ên li cem wan, li cem Heman û
Yedûtûn in û bona ku li ber derî
bin, lawên Yedûtûn danîn.
43 Û hemûya netewê, her kes
çûn malên xwe û Dawid, bona ku
mala xwe pîroz bike vegeriya.

*Soza ku Xwedê daye Dawid*

2.Sam 7,1-16

17 Û wusa bû ku, dema Dawid
di mala xwe de rûnişt, Da-
wid ji Natan peyxamber re got: A
vay, ez di malekî ku ji darê erzê
hatiye ava kirin de rûdinim, lê belê
Sindoqa Peymanê ya XUDAN di
bin perdeyan de disekine. 2 Û Na-
tan ji Dawid re got: Heçiyên ku di
dilê te de ne bike; ji ber ku Xwedê
bi te re ye. 3 Û wê şevê wusa bû
ku, vê gotina Xwedê ji Natan re
hat: 4 Here û ji qûlê min Dawid
re bibêje; XUDAN wusa dibêje:
Tuyê bona rûniştinê ji min re xanî
ava neke; 5 ji ber ku ji roja ku Îs-
raêlê derxistime heta îroj, li tu xa-
niyî rûneniştime, lê belê ji çadir,
ber bi çadirekî din, ji şunwarê ber-
bi şunwarekî din geriyam. 6 Ma li
hemû cîhên ku ez bi hemûya Îs-
raêlê li wan geriyame, ji serwerekî
Îsraêlê re, yê ku bona netewa min
bajon emir dame wan, tu carî go-
tinek: Ma çima we ji min re ji darê
erzê xaniyekî ava nekirin, gotime?
7 Û niha, tuyê ji qûlê min Dawid
re wusa bibêje: XUDANê artêşan
wusa dibêje: Bona ku tu li ser ne-
tewa min Îsraêlê bibe serwer, min
te ji hewşê, ji nava mîhan rahişt
8 û li cîhê ku tu meşiya ez bi te
re bûm û ji ber te hemû neyarên
te rahiştim û avêtim û ez ê mîna
navê mezinên li dinê ne, navekî ji
te re çêbikim. 9 Û ez ê bona ne-
tewa xwe Îsraêl cîhekî ava bikim
û ez ê wê biçikînim û dê li cîhê
xwe rûnê û êdî nelerize û mîna
demên berê 10 û wekî ji rojên ku
serweran li ser netewa xwe Îsraêlê
ve emir kirime, dê lawên xerabiyê
carekî din zehmetê nedin wan û
ez ê hemû neyarên te nizm bikim.
Û ez digihînim te, ku dê XUDAN
xaniyekî ji te re ava bike. 11 Û
dê wusa bibe ku, gava rojên te
biqedin û tu, bona ku bi bapîrên
xwe re be biçe, ez ê nîjada ku
paşî te, ji lawên te ve bibin, bidim
sekinandinê û ez ê qiraletiya wî
bizexmînim. 12 Dê ew ê ji min
re xanî ava bike û ez ê texta wî
abadîn bizexmînim. 13 Ez ê jê re
bibim bav û dê ew ê ji min re bibe
law û mîna ku xêra xwe ji yê berî

te şunda stendim, ez ê ji wî nestînim 14 û ez ê wî di mala xwe de û di qiraletiya xwe de her tim bidim sekinandin û dê texta wî abadîn bizexm e! 15 Natan li gor hemû van gotinan û li gor hemû vê xewn û xeyalê ji Dawid re got.

*Duaya Dawid*

2.Sam 7,17-29

16 Û qiral Dawid ket hundir û li ber XUDAN rûniştû got: Ya XUDAN Xwedê, ma ez kî me û mala min çi ye ku te min anî heta vê derê? 17 Û ev di çavê te de tiştekî biçûk hate xuyanî kirin, ya Xwedê! û te demekî dirêj bona mala vî qûlê xwe got û te mîna ku ez zilamekî bilind bim li min nihêrt, ya XUDAN Xwedê! 18 Ji ber mezintiya ku ji vî qûlê te ye, êdî Dawid dikare çi ji te re bibêje? Ji ber ku tu bi vî qûlê xwe dizane. 19 Ya XUDAN, bona xatirê qûlê xwe û li gor dilê te, bona gîhandina hemû van tiştên mezin, hemûya vê mezintiyê te kir! 20 Ya XUDAN, li gor her tiştên ku me bi guhên xwe ve bihîstine, yê mîna te nîne û xeynî te Xwedê nîne. 21 Ma wekî netewa te Îsraêl ya ku te neteweyan ji ber netewa xwe qewirand û bona bi karên mezin û tirsehêz ve ji xwe re nav çêbike, ya ku te bi fidyê ji Misirê xelas kiriye, li rûyê erdê gelekî din heye ku Xwedê wê bona ku ji xwe re bike netewe, bona xelaskirina wê çûyiye? 22 Û te netewa xwe Îsraêlê abadîn ji xwe re kir netewe û tu, XUDAN, tu ji wan re bû Xwedê. 23 Û niha, ya XUDAN, bila gotina ku te di derheqê qûlê xwe de û di derheqê mala wî de gotiye, bila abadîn li cîh be û mîna ku te gotiye bike! 24 Û bila: XUDANê artêşan Xwedayê Îsraêlê, ji Îsraêlê re Xweda ye! bibêjin ku bila navê te abadîn pêtandî be û bête mezin kirin û bila mala qûlê te Dawid li ber te li cîh bimîne! 25 Ji ber ku tu, ya Xwedayê min: Bi gotina: Ez ê ji te re xanî ava bikim, te guhê qûlê xwe vekir; ev qûlê te, ji ber vê yekê metirsiyê dît ku li ber te duê bike. 26 Û niha, ya XUDAN, tu Xweda ye û te ji qûlê xwe re vî tiştê qenc wad kir 27 û niha, bona ku abadîn li ber te be, pîroz kirina mala vî qûlê te, ji te re xweş hate xuyanî kirin; ji ber ku tu, ya XUDAN, te wî pîroz kir û abadîn bimbarek e!

*Serfiraziyên Dawid*

2.Sam 8,1-18

18 Û paşî vêya wusa bû ku, Dawid li Filistiyan xist û seriyên wan da xwar kirin û Gat û navçeyên wê ji destê Filistiyan stend. 2 Û li Moabê xist û Moabiyan bûn qûlê ku xercê didin Dawid.

3 Û dema Dawid bona ku serweriya xwe li cem çemê Feratê ava

bike diçû, li cem Hamatê, li qiralê
Tsoba Hadadezer xist. 4 Û Dawid
ji wî hezar erebeyên cengê û heft
hezar siwarî û bîst hezar peya
stend û Dawid hemû hespên ere-
beyan seqet kir, tenê ji wan qasî
sed erebeyî hişt.
5 Û Sûriyeyiyên Şamê, bona ku
alîkariyê ji Hadadezerê qiralê Tso-
ba re bikin hatin û Dawid ji Sûri-
yeyiyan li bîst û du hezar kesî xist.
6 Û Dawid leşkeran danî Sûriya
Şamê û yên Sûriyî, bûn qûlên ku
xercê didin Dawid. Û XUDAN,
li her cîhên ku çûyiye serkeftinê
da Dawid. 7 Û Dawid mertalên
zêr ên ku aîdî qûlên Hadadezer
bûn rahişt û wan anî Orşelîmê.
8 Û Dawid ji Tîbhat û Kûnê ên ku
bajarên Hadadezer in gellekî tûncî
rahişt; Silêman behra tûncî û sitûn-
an û feraxên tûncî ji wê çêkir.
9 Û dema qiralê Hamatê Toû bihîst
ku Dawid li hemûya artêşa qiralê
Tsoba Hadadezer xistiye, 10 bona
ku rewş û xatirê Dawid bipirse û
wî pîroz bike, lawê xwe Hadoram
şand cem wî, ji ber ku Dawid bi
Hadadezer re cengê kiribû û li wî
xistibû – ji ber ku cenga Toû û Ha-
dadezer hebû – û di destê wî de bi
her celebî pertalên zêr û zîv û tûnc
hebûn. 11 Qiral Dawid vana jî tevî
hemû zêr û zîvên ku ji netewan, ji
Edomê û ji Moabê û ji lawên Am-
mon û ji Filistiyan û ji Amalekê
anîye, ji XUDAN re tirxan kir.
12 Û Abîşayê lawê Serûya di ne-
wala Xwê de ji Edomiyan li hîj-
deh hezar kesî xist. 13 Û leşkeran
danî Edomê û hemûyên Edomî ji
Dawid re bûn qûl. Û XUDAN li
her cîhê ku Dawid çûyê serkeftinê
da wî.

*Wezîfedarên Dawid*

14 Û Dawid li ser hemûya Îsraêlê
qiraletiyê kir û ji hemûya netewa
xwe re darazî û dadiyê kir. 15 Û
Yoabê lawê Serûya li ser artêşê
bû û Yehoşafatê lawê Ahîlûd
bûyernivîs bû 16 û Tsadokê lawê
Ahîtûb û Abîmelekê lawê Abîa-
tar kahîn bûn û Şawşa katib bû
17 û Benayayê lawê Yehoyada
li ser Keretiyan û Peletiyan bû û
lawên Dawid li cem qiral yên ku
yekemîn in bûn[1].

*Dawid Ammonî û Sûriyan mexlûb dike*

2.Sam 10

19 Û paşî vêya wusa bû ku, qi-
ralê lawên Ammon Nahaş
mir û li dêvila wî lawê wî bû qi-
ral. 2 Û Dawid got: Ez ji Hanûnê
lawê Nahaş re qenciyê bikim, ji
ber ku bavê wî qenciyê bi min re
kir. Û ji ber bavê wî, bona sersaxi-
yê, Dawid şandiyan şand. Û qûlên
Dawid, bona sersaxiyê ji Hanûn
re bixwazin, hatin cem wî, welatê

1 An jî: Yên pêş ve tên bûn.

lawên Ammon. 3 Û ji serokên
lawên Ammon, ji Hanûn re gotin:
Ma tu dibêjî qey Dawid bi şandina
sersaxîvanan, hurmetê ji bavê te re
dike? Ma hatina qûlên wî yî cem
te, ne bona lêkolînê û xerakirinê û
sîxûriyê ne? 4 Û Hanûn bi qûlên
Dawid girt û rihên wan kur kir û
kincên wan, heta cîhê rûniştinê ji
navê ve çirand û wan şand. 5 Û
karê ku hatiye serê van zilamana
çûn û gîhandin Dawid. Û Dawid
bona pêrgîniya wan zilaman şand,
ji ber ku ew zilamana zehf şerm
dikirin. Û qiral got: Heta ku rîhên
we direj bibin, li Erîhayê rûnin û
wê gavê vegerin.
6 Û lawên Ammon dîtin ku xwe ji
Dawid re mekrûh kirine û Hanûn û
lawên Ammon, bona ku ji Mezo-
potamyayê û ji Aram-Maakayê û ji
Tsobayê ji xwe re bi berdêlê ere-
beyên cengê û siwaran bigirin hezar
talant[1] zîv şandin. 7 Û ji xwe re sîh
û du hezar erebe û qiralê Maakayê
û netewa wî bi mûçeyê girtin, ew
jî hatin û li ber Medeba artêşgehê
danîn. Û lawên Ammon ji bajarên
xwe ve civiyan û hatin cengê. 8 Û
Dawid bihîst û Yoab û hemû artêşa
egîdan şandin. 9 Û lawên Ammon
derketin û di deriyê bajêr de bona
cengê rêz bûn û qiralên ku hatibûn,
wekî din li beyarê bûn.
10 Û gava Yoab dît ku berê cengê
ji pêşî û paşiyê li hemberî wî ne,
ji hemû zilamên bijartî ên Îsraêlê
cuda kirin û wan li dijî Sûriyeyi-
yan rêz kirin. 11 Û yên ji ber nete-
wê mayîne dan destê birayê xwe
Abîşay û ew li hemberî lawên
Ammon rêz bûn. 12 Û got: Ger
Sûriyî ji min xwurttir bin, wê
gavê tuyê alîkariyê bi min re bike
û ger lawên Ammon ji te xwurttir
bin, wê gavê ez ê alîkariyê bi te re
bikim. 13 Bihêz be û bona netewa
me û bona bajarên Xwedayê me
em egîdiyan bikin! Û bila XU-
DAN ya ku di çavê xwe de qenc
e bike. 14 Û Yoab û netewa ku li
cem wî ne, li hemberî Sûriyeyiyan
bona cengê nêzîk hatin û ew ji ber
Yoab reviyan. 15 Û dema lawên
Ammon dîtin ku Sûriyî reviyan,
ew jî ji ber birayê wî Abîşay re-
viyan û ketin bajêr. Û Yoab hate
Orşelîmê[2].
16 Û gava Sûriyî dîtin ku li ber Îs-
raêl xera dibin, şandiyan şandin û
Sûriyiyê din, ên li wî aliyê çem[3], li
serê wan Şofakê serokê artêşa Ha-
dadezer, derxistin. 17 Û ji Dawid
re hate gîhandin û hemûya Îsraêlê
dan hev û ji Urdunê ve derbas bû
û bi ser wan ve hat û li hemberî
wan rêz danî. Û dema Dawid li
dijî Sûriyeyiyan rêz girêda, bi wî

[1] Li rasteka menan binêrin.
[2] An jî: Wê demê Yoab hate Orşelîmê.
[3] Çemê Feratê.

re cengê kirin. 18 Û Sûriyeyî ji ber Îsraêl ve reviyan û Dawid ji Sûriyeyiyan heft hezar heb erebeyî cengewar û çel hezar leşkerê peya kuşt, serokê artêşê Şofak jî kuşt. 19 Û dema qûlên Hadadezer dîtin ku li ber Îsraêlê xera dibin, bi Dawid re aşitiyê danîn û jê re qûlitiyê kirin û êdî Sûriyî nexwestin ku alîkariyê bi lawên Ammon re bikin.

*Bajarê Rabba tête qezenc kirin*

2.Sam 11-12; 21,18-22

**20** Û wusa bû ku, di salvegerê de, di demsala ku qiral derdikevin seferê de, Yoab artêşê derxist seferê û welatê lawên Ammon wêran kir û hat û dorûber li Rabbayê girt. Lê belê Dawid li Orşelîmê rûdinişt. Û Yoab li Rabbayê xist û wê xera kir. 2 Û Dawid taca qiralên wê ji serên wan stend û giraniya wê talantek zêr dît û di wê de kevirên bi qîmet hebûn û li serê Dawid ve hate danîn û ji bajêr ve pirr malê talanê derxistin. 3 Û netewa ku tê de ye derxistin û wan danîn xîzaran û çartilên hesin û biviran. Û Dawid ji hemû bajarên lawên Ammon re wusa kir. Û Dawid û hemûya netewê vegeriyan Orşelîmê.

4 Û paşî vêya wusa bû ku li Gezerê bi Filistiyan re ceng derket; wê gavê Sîbbekayê Hûsayî, li Sîppayê ku ji lawên Rafa ye[1] xist û wan serî xwar kirin. 5 Û dîsa bi Filistiyan re ceng çêbû û Elhananê lawê Yaîr, li Lahmiyê birayê Golyatê Gatî xist, destiyê rima wî mîna rewda çilagê bû. 6 Û dîsa li Gatê ceng çêbû, li wir zilamekî qam dirêj hebû û tilîkên destên wî û tilîkên lingên wî şeş heb, şeş heb bîst û çar bûn; ew jî ji Rafayê hatibû dinê. 7 Û qadê ji Îsraêlê ve xwest û Yonatanê lawê Şîmeayê birayê Dawid li wî xist. 8 Vana li Gatê ji Rafa re hatibûn dinê û bi destê Dawid û bi destên qûlên wî ketin.

*Dawid jimartinê dike*

2.Sam 24,1-25

**21** Û Îblîs li dijî Îsraêlê rabû û bona ku Îsraêlê bijmêre Dawid tîz kir. 2 Û Dawid ji Yoab re û ji serokên netewê re got: Herin, ji Beer-Şebayê heta Danê Îsraêlê bijmêrin û agahiyê bighînin ji min re ku, ez bi hejmarên wan bizanibim. 3 Û Yoab got: Bila XUDAN netewa xwe ji hebûna wan, sed qatî zêdetir bike! Lê belê efendiyê min qiral, ma ew hemû ne qûlên efendiyê min in? Çima efendiyê min li vê yekê digere? Dê çima gunehê bi ser Îsraêlê ve bîne? 4 Lê belê gotina qiral, li dijî Yoab bi ser ve ket. Û Yoab derket û li hemûya Îsraêlê geriya û hate Orşelîmê. 5 Û Yoab hejma-

1 An jî: Dêw.

ra netewa ku hatiye nivîsandin
da Dawid. Û hemûya Îsraêl, ên
ku şûrê dikişînin mîlyonek û sed
hezar kes bû û Cihûda çar sed û
heftê hezar kesên ku şûr dikişînin
bû. 6 Lê belê di nav wan de Lêwî
û Benyamîn nejimartin; ji ber ku
gotina qiral ji Yoab re mekrûh bû.
7 Û ev kar di çavê Xwedê de xe-
rab bû û li Îsraêlê xist. 8 Û Da-
wid ji Xwedê re got: Bi kirina vî
karî, min bi xwe sûcekî mezin kir
û niha ez lava dikim, tu gunehê
vî qûlê xwe nehesibîne; ji ber ku
zehf bêaqiltiyê kirim!
9 Û XUDAN bi Gadê ku Dibîne
yê Dawid re axifî û got: 10 Here
û bi Dawid re biaxife û jê re bi-
bêje: XUDAN wusa dibêje: Ez
sê tiştî datînim ber te; bona xwe
ji wan yekê hilbijêre ku ez wê ji
te re bikim. 11 Û Gad hate cem
Dawid û jê re got: XUDAN wusa
dibêje: Yê ku tu dixwaze rahêle!
12 An sê sal xela; an dê şûrê ne-
yarên te bighêje te û sê mehî tuyê
li ber yên ku tengasiyê didin te bi-
qede û bitefe; an jî sê roj şûrê XU-
DAN û milyaketê XUDAN dê di
hemû sînorên Îsraêlê de xera bike
û di welêt de weba hebe. Û niha
binêre, ez çi bersivî ji yê ku min
şandiye re bibim? 13 Û Dawid ji
Gad re got: Ez zehf aciz dibim,
niha ez bikevim destê XUDAN, ji
ber ku rehmetên wî zehf zêde ne û
ez nekevim destên mirovan. 14 Û
XUDAN webayê şand ser Îsraêlê
û ji Îsraêlê ve heftê hezar kes ke-
tin. 15 Û Xwedê bona ku Orşelîmê
xera bike, milyaketekê jê re şand
û dema ku wî xera dikir, XUDAN
nihêrt û ji ber asiwê poşman bû û
ji milyaketê xerakir re got: Bes e!
niha destê xwe bikişîne. Û mil-
yaketê XUDAN li ber bêndera
Ornanê Yebûsî sekinîbû. 16 Û
Dawid çavên xwe rakir û milya-
ketê XUDAN, di destê wî de şûrê
tazî, bi ser Orşelîmê ve dirêjkirî,
di nav erd û ezman de sekinî dît.
Û Dawid û kalepîran, li xwe per-
tal pêçayî, bi ser rû ve ketin. 17 Û
Dawid ji Xwedê re got: Ma yê ku
emrê jimartina netewê daye, ne ez
im? Zilamê ku sûc kiriye û zehf
xerabiyê kiriye, ez im; lê belê ma
van mîhan çi kirin? Ya XUDAN,
Xwedayê min, ez lava dikim, bila
destê te li dijî min û li dijî mala
bavê min be; lê belê bila bona
lêxistinê ne li dijî netewa te be!
18 Û milyaketê XUDAN, bi
gotina: Bila Dawid derkeve û
li cîhê bêndera Ornanê Yebûsî
pêşkêşîgehekê ji XUDAN re çê-
bike, ji bo ku ji Dawid re bibêje,
emir da Gad. 19 Û li gor gotina ku
Gad bi navê XUDAN gotiye, Da-
wid derket. 20 Û Ornanê bi paşî
xwe ve zivirî û milyaket dît û çar
lawên wî, ên ku bi wî re bûn, xwe
veşartin. Û Ornan genim dukuta.
21 Û Dawid berbi Ornan ve dihat

û Ornan nihêrt û Dawid dît û ji cîhê bênderê ve derket û ji Dawid re bi ser rû xwe avêt erdê. 22 Û Dawid ji Ornan re got: Vî cîhê bênderê bide min ku ez li wir ji XUDAN re pêşkêşîgehekê ava bikim; bona ku weba ji ser netewê rabe, tuyê wê bi tûmiya berdêla wê ve bide! 23 Û Ornan ji Dawid re got: Bila ya te be û bila efendiyê min qiral ya ku di çavê xwe de qenc e bike; a vay, mîna pêşkêşiya şewitandinê gayan û bona ku bibin êzing cercerê, bona ku bibe pêşkêşiya nan jî, ez ê genim bidim; ez giştikî didim. 24 Û qiral Dawid ji Ornan re got: Na, lê belê ez muheqeq, bi tûmiyê perê wê bistînim; ji ber ku ez tiştekî ku malê te ye, bona XUDAN nastînim û pêşkêşiya şewitandinê ya bê berdêl bi dest ve ketiye pêşkêş nakim! 25 Û Dawid bona cîh, di tereziyê de şeş sed şekel[1] zêr da Ornan. 26 Û Dawid li wir ji XUDAN re pêşkêşîgehê çêkir û pêşkêşiyên şewitandinê û pêşkêşiyên xweşiyê pêşkêş kir û bangî XUDAN kir û XUDAN li ser pêşkêşîgeha şewitandinê bi agir ve bersivê da wî. 27 Û XUDAN ji milyaket re got; ew jî dîsa şûrê xwe xist qewda wê.
28 Wê gavê li cîhê bêndera Ornanê Yebûsî, dema Dawid dît ku XUDAN bersivê da wî, li wir qurbanan serjê kir. 29 Û şunwara XUDAN û pêşkêşîgeha pêşkêşiyên şewitandinê ya ku Mûsa li çolê çêkiribû, wê gavê li cîhê bilindê li Gîbeonê bû. 30 Lê belê Dawid hêz neanî ku bona ji Xwedê bipirse here ber wî; ji ber ku ji ber şûrê milyaketê XUDAN ditirsiya.

*Amadekariyên bona Perestgehê*

1.Dîr 29,1-5

22 Û Dawid got: Mala XUDAN Xwedê ev e û pêşkêşîgeha pêşkêşiyên ku bona Îsraêlê tên şewitandinê ev e.
2 Û Dawid bona ku xerîbên li welatê Îsraêlê ne, bicivin, emir da û bona mala Xwedê ava bikin kevirên qewartî biqeşêrin kevirvanan danî. 3 Û Dawid bona pelên deriyan mixan û bona milên encamê zehf hesin û tûncê ku di zêdeyiyê de nayê wezinandin 4 û darên erzê ên ku nayên jimartinê amade kir; ji ber ku Saydayî û Sûriyan ji Dawid re pirr darên erzê anîbûn. 5 Û Dawid got: Lawê min Silêman ciwan e û cahil e û xaniyê ku dê ji XUDAN re bête avakirin zehf mezin e û hewce dike ku di hemû welatan de bi nav û mezin bibe; ji ber vê yekê, ez ê bona wê amadekariyê bikim. Û Dawid berî mirina xwe, zehf amadekariyê kir.
6 Û bangî lawê xwe Silêman kir û bona ku ji Xwedayê Îsraêlê XUDAN re xanî çêbike emir da wî.

1 Li rasteka menan binêrin.

7 Û Dawid ji lawê xwe Silêman
re got: Ez bi xwe; ji bo navê XU-
DAN Xwedê xanî ava kirin di dilê
min de hebû. 8 Lê belê vê gotina
XUDAN ji min re hat: Te zehf
xwîn rijand û cengên mezin çêkir;
tuyê ji navê min re xanî ava neke,
ji ber ku te li ber çavê min zehf
xwîn rijand erdê! 9 A vay, dê ji
te re lawekî bibe û dê ew bibe zi-
lamê aşitiyê û ez ê bi hemû aliyan
ve aramiyê bidim wî; ji ber ku dê
navê wî Silêman bibe û di rojên
wî de ez ê xweşî û aramiyê bidim
Îsraêlê. 10 Yê ku dê ji navê min
re xanî ava bike ew e û dê ew ê
ji min re bibe law û ez ê jê re bi-
bim bav û ez ê li ser Îsraêlê texta
qiraletiya wî abadîn bizexmînim.
11 Niha, lawê min, bila XUDAN
bi te re be û bila karê te rast here
û mala XUDAN, Xwedayê xwe,
mîna ku di derheqê te de gotiye,
ava bike! 12 Lê bila XUDAN
zanyarî û fêhmkariyê bide te û bila
di derheqê Îsraêlê de emir bide te;
da ku, tu bi zagona Xwedayê xwe
XUDAN ve bigire! 13 Û ger tu,
bona kirina wan, bi zagon û dara-
ziyên ku XUDAN di derheqê Îs-
raêlê de emir dayiye Mûsa, bigirî
wê gavê dê karên te qenc herin;
bihêz û bidil be; metirse û nekeve
bêzariyê! 14 Û a vay, ez di vî halê
xwe yî kêm[1] de bona mala XU-
DAN sed hezar talant zêr û hezar
car hezar talant zîv û bêyî wezin
tûnc û hesin amade kirim, ji ber
ku zehf zêde ye; dar û keviran jî
amade kirim û tu dikarî bi ser wan
ve zêde bike. 15 Û li cem te gel-
lek karker, yên ku kevir diqeşêrin,
karkerên dar û keviran û di her
cûreyê karê de bi her celebî zilamê
bi huner hene; 16 hejmara zêr, zîv,
tûnc û hesin jî nîne. Rabe û bike û
bila XUDAN bi te re be!
17 Û Dawid ji hemû serokên Îs-
raêlê re, bona ku alîkariyê bi lawê
wî Silêman re bikin emir kir û
got: 18 Ma XUDAN Xwedayê
we ne bi we re ye? Û aramiyek
bi dorûber neda we? Ji ber, yên
ku li welat rûdinin da destê min
û li ber XUDAN û li ber netewê
welat serî xwar kirin. 19 Niha
destpê bikin û bi dil û can li Xwe-
dayê xwe XUDAN bigerin û ra-
bin û bona ku Sindoqa Peymanê
ya XUDAN û feraxên pîroz ên
Xwedê bînin hundirê xaniyê ku
bi navê XUDAN ve tête ava ki-
rin, Cîhê Herî Pîroz yê XUDAN
Xwedê çêbikin.

*Wezîfeyên Lêwiyiyan*

23 Û Dawid kal bûbû û ji ro-
jan ve têr bûbû û lawê xwe
Silêman, li ser Îsraêlê ve kir qiral.
2 Û hemû serokên Îsraêlê û kahîn-
an û Lêwiyiyan civand. 3 Û Lêwi-
yiyên ku sîh salî ne û jê berjortir

[1] Di tengasiya xwe de.

in, hatin jimartin û hejmara wan
yek û yek sîh û heyşt hezar zilam
bû. 4 Bîst û çar hezarê vana, bona
nihêrtina karê mala XUDAN bûn
û şeş hezarên wan karmend û dad-
ger bûn 5 û çar hezar ji wan der-
gevan bûn û bi haletên mûsikê ên
ku Dawid: Bona ku şikiryê ji XU-
DAN re bikim, min çêkir gotiye,
çar hezarî jî şikiryê ji XUDAN re
dikirin. 6 Û lawên Lêwî; Gerşon,
Kohat û li gor lawên Merarî, Da-
wid wan bi taximan cuda kir.
7 Ji Gerşoniyan: Ladan û Şîmeî.
8 Lawên Ladan: Serok Yehîêl,
Zetam û Yowêl, sê kes. 9 Lawên
Şîmeî: Şelomot, Hazîel û Ha-
ran, sê kes. Vana serokên malên
bapîrên Ladan bûn. 10 Û lawên
Şîmeî: Yahat, Zîza û Yeûş û
Berîa. Ev her çaran lawên Şîmeî
bûn. 11 Û Yahat serî û Zîza yê du-
wem bû; lê belê pirr lawên Yeûş û
Berîa tune bûn û di hejmarekê de
bûn malekî bapîran.
12 Lawên Kohat: Amram, Yîts-
har, Hebron û Ûzzîel, çar kes.
13 Lawên Amram: Harûn û Mûsa
û Harûn, bona ku tiştên herî birû-
met pîroz bike, li ber XUDAN
buxurê vêxe, jê re xizmetê bike û
abadîn bi navê wî ve pîroz bike,
ew û lawên xwe abadîn hatin cuda
kirin. 14 Lê belê dema em werin
Mûsayê zilamê Xwedê, lawên wî
ji nava nîjada Lêwî ve hatin ji-
martin. 15 Lawên Mûsa: Gerşom
û Elîezer. 16 Lawên Gerşom: Serî
Şebûêl. 17 Û lawên Elîezer: Serî
Rehabya û wekî din lawên Elîezer
tune bûn; lê belê gellek lawên Re-
habya hebûn. 18 Lawên Yîtshar:
Serî Şelomît. 19 Lawên Hebron:
Serî Yeriya, duwem Amarya,
sêwem Yahazîel û çaremîn Ye-
kameam. 20 Lawên Ûzzîel: Serî
Mîka û duwem Îşşiya.
21 Lawên Merarî: Mahlî û Mûşî.
Lawên Mahlî: Eleazar û Kîş. 22 Û
Eleazar mir û lawên wî tune bûn,
lê tenê qîzên wî hebûn û birayên
wî, lawên Kîş wan bi jinitî ji xwe
re stendin. 23 Lawên Mûşî: Mahlî
û Eder û Yeremot, sê kes.
24 Li gor malên bapîran lawên
Lêwî, yên bîst salî û jê jortir, se-
rokên malên bapîran, ên ku yek
û yek, bi hejmarên navên xwe ji
wan hatine hesibandin, ên ku bona
xizmeta mala XUDAN kar dikin
vana bûn. 25 Ji ber ku Dawid got:
Xwedayê Îsraêlê XUDAN, ara-
miyê daye netewa xwe û abadîn
li Orşelîmê şunwarê girtiye 26 û
Lêwiyiyan êdî dê şunwarê û bona
xizmeta wî feraxan nekişînin.
27 Ji ber, li ser gotinên dawîn ên
Dawid lawên Lêwî ên bîst salî û
jê mezintir hatin jimartin. 28 Ji ber
ku wezîfeya wan, bona xizmeta
mala XUDAN, di hewşan de û di
odeyan de û di paqij kirina hemû
tiştên pîroz de, di karê xizme-
ta mala Xwedê de li cem lawên

Harûn bûyîn 29 û ji nanê aramiyê
re û dixwaze nanê sêlê yên bêyî ha-
vên û dixwaze tiştên ku di sêlê de
tên kelandin û dixwaze jî li nihêr-
tina arvanê zirav yê ku bi xisûsiyet
bona nanê pêşkêşiyê ye nihêrtin
30 û her sibeh û her êvarê bona ku
ji XUDAN re şikirî û hemdê kirinê
sekinandin 31 û di rojên Sebtê de û
di serê mehan de û di cejnên bijar-
tî de bi hejmara hemû pêşkêşiyên
şewitandinê û li gor ûsila ku di
derheqê wan de ye, her tim li·ber
XUDAN, ji XUDAN re pêşkêşî
kirin bû 32 û bona xizmeta mala
XUDAN, notirvaniya Çadira Ci-
wandinê û notirvaniya cîhê pîroz
û notirvaniya birayên xwe lawên
Harûn digirtin.

*Wezîfeyên Kahînan*

24 Û taximên lawên Harûn
vana bûn. Lawên Harûn:
Nadab û Abîhû, Eleazar û Îtamar.
2 Lê belê Nadab û Abîhû, berî
bavên xwe mirin û lawên wan
tune bûn; ji ber vê yekê Eleazar
û Îtamar kahîntiyê kirin. 3 Û Tsa-
dokê ji lawên Dawid û Eleazar û
Ahîmelekê ji lawên Îtamar, wan
di xizmetên xwe de li gor karên
xwe cuda kirin. 4 Û ji lawên Îta-
mar zêdetir di nav lawên Eleazar
de hîn jî pirrtir zilamên serek ha-
tin dîtin û ev bi vî awahiyê cuda
bûn: Ji lawên Eleazar, serokên
mala bapîran şanzdeh û ji lawên
Îtamar, li gor malên bapîran heyşt.
5 Ev û wan bi vî awayî bi pişkê ve
cuda bûn, ji ber ku him ji lawên
Eleazar, him jî ji lawên Îtamar
bona Cîhê Herî Pîroz serokan û
bona Xwedê serokan hebûn. 6 Û
li ber qiral û serokan û kahîn Tsa-
dok û Ahîmelekê lawê Abîatar û
kahînan û serokên malên bapîrên
Lêwiyiyan, ji Lêwiyiyan nivîskar
Şemayayê lawê Netanel wan nivî-
sand; malekî bapîran bona Eleazar
hate girtin, yek jî bona Îtamar hate
girtin.
7 Û pişka yekem ji Yehoyarîb
re, ya duwem ji Yedaya re, 8 ya
sêwem ji Harîm re, ya çaremîn ji
Seorîm re, 9 ya pêncan ji Malkiya
re, ya şeşan ji Miyamîn re, 10 ya
heftan ji Hakkots re, ya heyştan
ji Abiya re, 11 ya nehan ji Yêşûa
re, ya dehan ji Şekanya re, 12 ya
yanzdehan ji Elyaşîb re, ya donz-
dehan ji Yakîm re, 13 ya sêzde-
han ji Hûppa re, ya çardehan ji
Yeşebeab re, 14 ya panzdehan
ji Bîlga re, ya şanzdehan ji Îm-
mer re, 15 ya hivdehan ji Hezîr
re, ya hîjdehan ji Happîtses re,
16 ya nozdehan ji Petahya re, ya
bîstan ji Yehezkel re, 17 ya bîst û
yekan ji Yakîn re, ya bîst û dudan
ji Gamûl re, 18 ya bîst û sisiyan
ji Delaya re, ya bîst û çaran ji
Maazya re derket. 19 Mîna ku
Xwedayê Îsraêlê XUDAN emir
daye, ya bi destê bapîrên wan

Harûn hatiye dayîn, li gor ûsila wan bona ketina mala XUDAN di xizmetên wan de dora wan ev bû. 20 Û gava em werin lawên Lêwî ên ku ji ber mayîne: Şûbaêlê ji lawên Amram; Yehdeyayê ji lawên Şûbaêl. 21 Ji Rehabya: Ji lawên Rehabya, Îşşiyayê serek. 22 Ji Yîtshariyan Şelomot; ji lawên Şelomot, Yahat. 23 Û ji lawên Hebron: Serek Yeriya, duwem Amarya, sêwem Yahazîel, çaremîn Yekameam. 24 Lawên Ûzzîel, Mîka; ji lawên Mîka, Şamîr. 25 Birayê Mîka, Îşşiya; ji lawên Îşşiya Zekarya. 26 Lawên Merarî: Mahlî û Mûşî; lawên Yaaziya: Beno. 27 Lawên Merarî: Ji Yaaziya, Beno û Şoham û Zakkûr û Îbrî. 28 Ji Mahlî: Eleazar; lawên wî tune bûn. 29 Ji Kîş; lawên Kîş: Yerahmeel. 30 Û lawên Mûşî: Mahlî û Eder û Yerîmot. Li gor malên bapîrên wan lawên Lêwiyiyan vana bûn. 31 Birayên wan lawên Harûn çawa avêtibin, vana jî li ber qiral Dawid û Tsadok û Ahîmelek û kahînan û li ber serokên malên bapîrên Lêwiyiyan, serokên malên bapîran mîna birayên xwe yî biçûk, pişkê avêtin.

*Murxgeran*

25 Û Dawid û serokên artêşan, hinekên ji lawên Asaf û Heman û Yedûtûn, bona ku bi çenkan, santûran û zîlan peyxambertiyê bikin, bona xizmetê cuda kirin û hejmara yên ku li gor xizmetên xwe karê dikin ev bû: 2 Ji lawên Asaf: Zakkûr û Ûsiv û Netanya û Aşarela, lawên Asaf, ên ku di bin destê Asafê ku bi emrê qiral peyxambertiyê dikire de bûn. 3 Ji Yedûtûn: lawên Yedûtûn: Gedalya û Tserî û Yeşaya, Haşabya û Mattîtya û Şîmî, şeş kesên ku di bin destê bavên xwe Yedûtûnê ku şikirî û hemdê ji XUDAN re dike de û bi çenkê re peyxambertiyê dike. 4 Ji Heman: Lawên Heman: Bûkkiya, Mattanya, Ûzzîel, Şebûel û Yerîmot, Hananya, Hananî, Elîata, Gîddaltî û Romamtî-Ezer, Yoşbekaşa, Mallotî, Hotîr, Mahazîot. 5 Vana hemû, lawên Hemanê bona ku qiloçê rake, di gotinê Xwedê de Dîtiyê qiral e bûn. Û Xwedê çardeh law û sê qîz da Heman. 6 Hemûyên vana, bi zîlan, bi santûran û bi çenkan bona xizmeta mala Xwedê, di bin destê bavên xwe de, di mala XUDAN de bona sitirînê bûn; Asaf, Yedûtûn û Heman jî di bin emrê qiral de bûn. 7 Tevî birayên xwe, ên ku ji wan re bona XUDAN sitirandin hatiye hîn kirin, hejmara hemûyên ku bi huner bûn, du sed û heyştê û heyşt bûn. 8 Û hemû, yê mezin jî, yê biçûk jî, yê dide hîn kirin jî, yê hîn dibe jî, wek hev bona wezîfeyên xwe pişkê avêtin. 9 Û pişka yekemîn bona Asaf ji

Ûsiv re derket; ya duwemîn ji
Gedalya re; ew û birayên wî û
lawên wî donzdeh; 10 ya sêwem
ji Zakkûr re, lawên wî û birayên
wî, donzdeh; 11 ya çaran ji Îtsrî
re, lawên wî û birayên wî, donz-
deh; 12 ya pêncan ji Netanya re,
lawên wî û birayên wî, donzdeh;
13 ya şeşan ji Bûkkiya re, lawên
wî û birayên wî, donzdeh; 14 ya
heftan ji Yeşarela re, lawên wî
û birayên wî, donzdeh; 15 ya
heyştan ji Yeşaya re, lawên wî û
birayên wî, donzdeh; 16 ya nehan
ji Mattanya re, lawên wî û birayên
wî, donzdeh; 17 ya dehan ji Şîmeî
re, lawên wî û birayên wî, donz-
deh; 18 ya yanzdehan ji Azarel
re, lawên wî û birayên wî, donz-
deh; 19 ya donzdehan ji Haşabya
re, lawên wî û birayên wî, donz-
deh; 20 ya sênzdehan ji Şûbael re,
lawên wî û birayên wî, donzdeh;
21 ya çardehan ji Mattîtya re,
lawên wî û birayên wî, donzdeh;
22 ya panzdehan ji Yeremot re,
lawên wî û birayên wî, donzdeh;
23 ya şanzdehan ji Hananya re,
lawên wî û birayên wî, donzdeh;
24 ya hivdehan ji Yoşbekaş re,
lawên wî û birayên wî, donzdeh;
25 ya hîjdehan ji Hananî re, lawên
wî û birayên wî, donzdeh; 26 ya
nozdehan ji Mallotî re, lawên wî û
birayên wî, donzdeh; 27 ya bîstan
ji Elîata re, lawên wî û birayên
wî, donzdeh; 28 ya bîst û yekan
ji Hotîr re, lawên wî û birayên
wî, donzdeh; 29 ya bîst û dudan
ji Gîddaltî re, lawên wî û birayên
wî, donzdeh; 30 ya bîst û sisiyan
ji Mahazîot re, lawên wî û birayên
wî, donzdeh; 31 ya bîst û çaran ji
Romamtî-Ezer re; lawên wî û bi-
rayên wî, donzdeh.

*Notirvanên Deriyê Perestgehê*

26 Taximên dergevanan: Ji
Korahiyan, ji lawên Asaf,
Meşelemyayê lawê Kore. 2 Û
lawên Meşelamya: Lawê wî yê
yekemîn Zekarya, yê duwem
Yedîaêl, yê sêwem Zebadya, yê
çaran Yatnîêl, 3 yê pêncan Elam,
yê şeşan Yehohanan, yê heftemîn
Elîhoenay. 4 Û lawên Obêd-
Edom: Lawê wî yê yekemîn
Şemaya, yê duwem Yehozabad,
yê sêwem Yoah, yê çaremîn Sakar
û yê pêncan Netanel, 5 yê şeşan
Ammiyêl, yê heftan Îssakar, yê
heyştan Peyûlletay; ji ber ku
Xwedê wî pîroz kiribû. 6 Û ji
lawê wî Şemaya re law hatin dinê,
di mala bavên xwe de bûn serek;
ji ber ku egîdên dilawêr bûn. 7
Lawên Şemaya: Otnî û Refael û
Obêd, Elzabad, birayên wî egîdên
dilawêr bûn, Elîhû û Semakya.
8 Hemûyên vana ji lawên Obêd-
Edom bûn; vana, lawên wan û bi-
rayên wan, zilamên dilawêr ên ku
bona xizmetê xwurt in; ji Obêd-
Edomê şêst û du kes. 9 Û lawên

*Rêvebirên Eşîrên Îsraêlê*

16 Û li ser nîjadên Îsraêlê; ji Rûbeniyan Elîezerê lawê serok Zîkrî; ji Şîmeûniyan, Şefatyayê lawê Maaka; 17 ji Lêwî, Haşabyayê lawê Kemûêl; ji Harûn ve Tsadok; 18 ji Cihûda, ji birayên Dawid Elîhû; ji Îssakar, Omriyê lawê Mîkael; 19 ji Zebûlûn, Îşmaiyayê lawê Obadya; ji Naftalî, Yeremotê lawê Ezriyêl; 20 ji lawên Efrayîm, Hoşeyayê lawê Azazya; ji nîv nîjada Manaşşe, Yowêlê lawê Pedaya; 21 ji nîv nîjada Manaşşe ya ku li Gîleadê ye, Îddoyê lawê Zekarya; ji Benyamînê Yaasiyêlê lawê Abner; 22 ji Danê Azarelê lawê Yeroham. Serokên nîjadên Îsraêlê vana bûn. 23 Lê belê Dawid, hejmara kesên bîst salî ne, jê berjêrtir in nestend, ji ber ku XUDAN gotibû ku dê ew ê Îsraêlê qasî sitêrkên ezmanan zêde bike. 24 Yoabê lawê Serûya, dest bi jimartinê kir, lê belê neqedand û ji ber vê yekê hêrs bi ser Îsraêlê ve hat û hejmar, di pirtûka Dîrokan ya qiral Dawid de nexistin hisabê.

*Rêvebirên Qiral*

25 Û li ser embarên qiral Azmavetê lawê Adîel hebû û li ser embarên ku li beyaran, li bajaran û li gundan û li birca ne, Yonatanê lawê Ûzziya hebû 26 û li ser yên ku bona karê erdê di zeviyan de dixebitin Ezriyê lawê Kelûb hebû 27 û li ser rezan Şîmeiyê Ramayî hebû û li ser zadê rezan ên ku bona serdaba xemrê ye Zabdiyê Şîfamî 28 û li ser zeytûngehê û li darên hêjîra bejik, yên ku li Şefelayê[1] ne, Baalhananê Gederî hebû û li ser serdabên rûnê Yoaş 29 û li ser ganêrên ku li Şaronê tên çêrandin, Şîtrayê Şaronî hebû û li ser ganêrên ku di çeman de ne Şafatê lawê Adlay hebû 30 û li ser deveyan Obîlê Simayîlî hebû û li ser keran Yehdeyayê Meronotî û li ser mîhan[2] Yazîzê Hagrî hebû. 31 Hemûyên vana li ser malê qiral Dawid ve serok bûn.

32 Û apê Dawid Yonatan, şêwirdar bû; zilamekî fêhmkar û nivîskar bû û Yehîêlê lawê Hakmonîn li cem lawên qiral bû 33 û Ahîtofel mişawrê qiral bû û Hûşayê Arkî hevalê qiral bû 34 û paşî Ahîtofel Yehoyadayê lawê Benaya û Abîatar hebûn û serokê artêşa qiral Yoab bû.

*Pêşniyarên Dawid yên di derheqê Perestgehê de*

28 Û Dawid hemû serokên Îsraêlê, serokên nîjadan û serekên liqên ku bi nobedariyê ji qiral re xizmetê dikin û serokên hezaran û serokên sedan û se-

1 Cihê çiyayî yê ku li rojhilata deşta qeraxê ye.

2 Keriyan, an jî: Pez.

rokên hemû mal û keriyên qiral
û lawên wî, karmendên wî yên
serayê û egîdan, hemû egîdên wî
yên dilawêr, li Orşelîmê civand.
2 Û qiral Dawid rabû ser pêlan
û got: Ya birayên min û netewa
min, min guhdarî bikin! Bona
Sindoqa Peymanê ya XUDAN û
bona pêlika lingên Xwedayê me,
xaniyekî rehetiyê ava kirin di dilê
min de hebû û bona avakirina wê
amadekariyê kiribûm. 3 Lê belê
Xwedê ji min re got: Tuyê bona
navê min xanî çênekî, ji ber ku
tu zilamê cengê yî û te xwîn ri-
jand. 4 Lê belê Xwedayê Îsraêlê
XUDAN, bona ku abadîn li ser
Îsraêlê bibe qiral, ji hemûya mala
bavê min, min bijart; ji ber ku bi
serwerî Cihûda û di mala Cihûda
de mala bavê min bijart; bona ku
li ser hemûya Îsraêlê bike qiral, ji
nava lawên bavê min, min xweş
dît 5 û ji hemû lawên min, – ji
ber ku XUDAN pirr law dan min
–, bona ku li ser texta qiraletiya
XUDAN, ya li ser Îsraêlê ye bide
rûniştin lawê min Silêman bijart.
6 Û ji min re got: Lawê te Silê-
man, dê xanî û hewşên min ew ê
ava bike; ji ber ku min wî ji xwe
re bi lawitî bijart û ez ê ji wî re bi-
bim bav. 7 Ger mîna ku îroj wusa
ye, bona kirina emir û daraziyên
min baldar be, ez ê qiraletiya wî
abadîn bizexmînim. 8 Û niha, li
ber hemûya Îsraêlê, li ber çavên
civaka XUDAN û çawa ku Xwe-
dayê me dibihîze, bi hemû emirên
Xwedayê xwe XUDAN ve bi-
girin û lêkolînê bikin ku, hûn vî
welatê qenc ji xwe re bikin milk
û paşî xwe hûn ji zarokên xwe re
abadîn wê bi mêrasî bihêlin.
9 Û tu, lawê min Silêman,
Xwedayê bavê xwe binase û bi
hemûya dil û bi canekî daxwaz-
kar jê re qûlitiyê bike! Ji ber ku
XUDAN lêkolînê li hemûya di-
lan dike û bi hemû gumreşiyên
fikirandinê dizane. Ger tu li wî
bigere, ew ê xwe bi te bide dîtin;
lê belê ger tu dev jê berde, abadîn
dê te bavêje. 10 Niha binêre! Ji
ber, bona ku bibe perestgeh, ava-
kirina xanî, XUDAN te bijart;
xwurt bibe û bike!
11 Û Dawid mînaka eywan û xa-
niyan û xezîneyan û xaniyên jorîn
û odeyên hundirîn û cîhê kefaretê
da lawê xwe Silêman 12 û bona
hewşa mala XUDAN û bona bi
dorûber hemûya odeyan, bona
xezîneyên mala Xwedê û bona
xezîneyên tiştên ku hatine pîroz
kirin 13 û bona kahînan û Lêwiyi-
yan û bona her karê xizmeta mala
XUDAN û bona hemû feraxên
xizmetê ên ku li mala XUDAN
in, 14 bona feraxên zêrîn û li gor
wezna wan ji zêran, bona hemû
feraxên her cûreyê xizmetê û
bona hemû feraxên zîv, bona
hemû feraxên her cûreyê xizmetê

ên li gor weznên wan û ji zîvê
ne, bi navdîtiya Ruh mînaka her
tiştên ku tê de ne[1], danê. 15 Her
şimadankê û li gor weznê qendîlên
wê, wezna şimadankên zêr û zîv
û li gor xizmeta her şimadankê
bona şimadankên zêrîn, li gor
her şimadankekê û qendîlên wê,
weznên wê 16 û bona sifrên nanê
aramiyê, bona her sifrê zêr û bona
sifrên zîvî wezna zîvê 17 û wez-
nên çanqolên goşt ên ku ji zêrê
safî û leganan û kaseyan û bona
tasên zêrîn, wezna her tasî û bona
tasên zîvî, wezna her tasî 18 û
bona pêşkêşîgeha buxurê, wezna
zêrê safî û li gor mînaka erebeya
kerûbiyên ku bazikên berdane û
Sindoqa Peymanê ya XUDAN
nuxumandine, wezna zêrê da.
19 Û Dawid got: Hemûya vêya,
hemû karên vê mînakê, ji aliyê
XUDAN ve bi nivîsê ji min re
hate agahî kirin.
20 Û Dawid ji lawê xwe Silê-
man re got: Xwurt be, bi dil be
û bike; metirse û nekeve bêza-
riyê! ji ber ku XUDAN Xwedê,
Xwedayê min bi te re ye; berî ku
hemûya karê mala XUDAN ne-
qede, te dernaxe valahiyê û dev ji
te bernade. 21 Û hemû karê mala
Xwedê taximên kahînan û Lêwi-
yiyan a vay, li vir in û her zilamê
bi xwestekê ku bi huner, bona her
celebê xizmetê, dê di her celebî
kar de bi te re be; hemûya nete-
wê tevî serokan, hemû li benda
emirên te ne!

*Diyariyên bona avakirina Perestgehê hatine dayîn*

29 Û qiral Dawid ji hemûya
civakê re got: Xwedê lawê
min Silêman, tenê wî bijart; xort
e û cahil e û kar mezin e; ji ber
ku ev qesir ne bona mirovan, lê
bona XUDAN Xwedê ye. 2 Û
ez bi hemû hêza xwe bona mala
Xwedayê xwe, bona tiştên zêrîn
zêr û bona tiştên zîvî zîv û bona
tiştên tûncî tûnc, bona tiştên he-
sinî, hesin û bona tiştên darînî
dar; kevirê heqîq û kevirên ku dê
bên çikandin, kevirên xişrê û cûre
bi cûre kevirên rengînî û her cele-
bê kevirên biqîmet û pirr kevirên
mermerî amade kirim. 3 Û xeynî
vêya, ji her tiştê ku bona xani-
yê pîroz amade kirime zêdetir,
madem ku xezîneya min ya zêr
û zîvan heye, di oxra hezkirina
min de ya ji mala Xwedê re heye,
4 wê ji zêrê ofîrê sê hezar talantî
zêr û bona rûyê dîwarên xanî bi-
gire heft hezar talant zêrê safî;
5 bona tiştên zêrînî zêr û bona
tiştên zîvî, zîvê, bona hemû karên
ku bi destê hunermendan bêne ki-
rin didim. Û bona ku xwe ji XU-
DAN re tirxan bike, dê kî îroj bi
dilê xwe ve pêşkêşiyê bide?

1 An ji: Pê re ne.

6 Û serokên malên bapîran û se-
rokên nîjadên Îsraêlê û serekên
hezaran û sedan û hemû serokên
ku li ser karên qiral in, bi dilên
xwe ve pêşkêş kirin 7 û bona xiz-
meta mala Xwedê ji zêrê ve pênc
hezar talant û deh hezar darîk[1] û ji
zîvê ve deh hezar talant û ji tûncê
ve hîjdeh hezar talant û ji hesin ve
sed hezar talant dan. 8 Û yên ku
bi wan re kevirên biqîmet hene bi
destê Yehîelê Gerşonî dan xezî-
neya mala XUDAN. 9 Û netewe
ji ber ku bi dilê xwe ve pêşkêş
kirin kêfxweş bûn, ji ber ku bi
hemûya dilê xwe ji XUDAN re
pêşkêş kirin û qiral Dawid jî bi
dilxweşiyek mezin kêfxweş bû.

*Pesnahiya Dawid*

10 Û Dawid li ber çavên hemûya
civakê XUDAN pîroz kir û Dawid
got: Tu ji destpêkê heta abadînê
pîroz e, Xwedayê bapîrê me Îs-
raêl, XUDAN! 11 Ya XUDAN,
mezinahî û qudret û bilindayî û
serfirazî û rewnaqî ya te ye; ji ber
ku her tiştên li ezman û li erdê ne,
yên te ne; ya XUDAN, qiraletî ya
te ye û tu, bi serîbûnê ji her tiştê
bilindtir î! 12 Û serwet û mezintî
ji te tê û tu serwerê her tiştî yî û
qudret û selahiyet di destê te de ne
û mezin kirin û xwurt kirina her
kesî di destê te de ye! 13 Û niha,
ya Xwedayê me, em şikiryê ji te
re dikin û ji navê te yî xweşik re
hemdê dikin. 14 Lê belê ez kî me û
netewa min çî ye ku, em bikaribin
wusa pêşkêşiyên ji dil bidin? Ji
ber ku her tişt ji te ye û me ji des-
tê te dan te. 15 Ji ber ku em li ber
te xerîb in û mîna hemû bapîrên
xwe mêvan in; rojên me li rûyê
erdê mîna siyê ne û mayîn nîne.
16 Ya XUDAN Xwedayê me,
hemûya vê xezîneya ku bona ji
navê te yî pîroz re avakirina xanî
me ji te re amade kirine di destê te
de ye û hemû yên te ne. 17 Û ez
dizanim ku, ya Xwedayê min, tu
dil diceribînî û ji rastiyê hez dikî.
Min hemûya van tiştan, bi rastiya
dilê xwe û bi dilê xwe pêşkêş kir
û bi kêfxweşiyê dîtim ku netewa
te ya ku li vir in, bi dilên xwe ji te
re pêşkêş kirin. 18 Ya XUDAN,
Xwedayê bapîrên me Birahîm, Îs-
haq û Îsraêl vêya di gumreşiya ra-
manên ku di dilê netewa te de ne,
abadîn veşêre û dilê wan ji xwe re
amade bike! 19 Û bona ku emirên
te, şahdeyiyên te û bi zagonên te
ve bigirin û bona ku hemûyên van
tiştan bikin û bona avakirina qesra
ku amadekariya wê dîtime, dilekî
bitûmî bide lawê min Silêman!
20 Û Dawid ji hemûya civakê re
got: Niha Xwedayê xwe XUDAN
pîroz bikin! Û hemûya civakê
Xwedayê bapîrên xwe XUDAN
pîroz kirin û seriyên xwe xwar

[1] Li rasteka menan binêrin.

kirin û ji qiral û XUDAN re peristin. 21 Û paşî wê rojê ji XUDAN re qurbanan serjê kirin û ji XUDAN re pêşkêşiyên şewitandinê, hezar ganêr, hezar beran, hezar berxik û pêşkêşiyên wanî tên rijandin û bona hemûya Îsraêlê pirr qurbanan pêşkêş kirin. 22 Û wê rojê bi kêfxweşiyekî mezin li ber XUDAN xwarin û vexwarin.

*Qiral Silêman bi rûn ve tête pîroz kirin*

Û Silêmanê lawê Dawid, cara duwemîn kirin qiral û bona XUDAN bi serokantî wî û bi kahîntî Tsadok mesh kirin. 23 Û Silêman li dêvila bavê xwe Dawid, bi qiraletî li ser texta XUDAN rûnişt û karê wî qenc çû û hemûya Îsraêlê gotina wî guhdarî kirin. 24 Û hemûyên serokan û egîdan û hemû lawên Dawid jî bûn girêdayiyên qiral Silêman. 25 Û XUDAN, Silêman di çavê hemûya Îsraêlê de zehf mezin kir û mezintiya qiraletiyê, ya ku berî wî li Îsraêlê di tu qiralî de nîne da wî.

*Mirina Dawid*

26 Û Dawidê lawê Îşay, li ser hemûya Îsraêlê qiraletiyê kir. 27 Û rojên ku li ser Îsraêlê qiraletiyê kir çel sal bûn; heft sal li Hebronê qiraletiyê kir û sîh û sê sal li Orşelîmê qiraletiyê kir. 28 Û bi rojan, bi serwetê û bi mezintiyê ve têr bûyî di kalepîrbûya xweşik de mir û li dêvila wî lawê wî Silêman bû qiral. 29 Û karên qiral Dawid, karên wî yên pêşîn û yên dawîn jî 30 û tevî hemû demên ku ji ser wî û ji ser Îsraêlê û hemû qiraletiyê welatan ve derbas bûye, hemû qiraletiya wî û hêza wî, a vay, di Pirtûka dîrokê ya Samûyêlê ku Dibîne de û di Pirtûka dîrokê ya peyxamber Natan de û di Pirtûka dîrokê ya Gadê ku Dibîne de nivîsandîne.

# 2. DÎROKAN

*Pêşgotin*

2.Dîrokan ya ku domahîka 1. Dîrokan e, karên ku qiral Silêman kirine û bûyerên dewra wî tîne ziman. Eşîrên bakur yên di bin pêşengiya Yeroboam de ne, li dijî Rehoboamê lawê qiral Silêman û yê ku li dêvila wî bûye qiral serî hildidin û qiraletî bi'du parî ve difeliqe. Di sala B.Z. 586'an de heta ketina Orşelîmê û sirgûniya Babîlê bûyer li dora qiraletiya Cihûda ya ku li başûr e derbas dibin. Pirtûk bi destûr dayîna Koreşê qiralê Farisan, ya ku bona Cihûdên li Babîlê bikaribin vegerin Orşelîmê dawî dibe.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-9:31 | Qiraletiya Silêman |
| a. 1:1-17 | Salên pêşiyê |
| b. 2:1-7:10 | Perestgeh tête avakirin |
| c. 7:11-9:31 | Salên dawîn |
| 10:1-19 | Serîhildana Eşîrên li bakur in |
| 11:1-36:12 | Qiralên Cihûdayê |
| 36:13-21 | Ketina Orşelîmê |
| 36:22-23 | Danezana Koreşê qiralê Farisan |

*Silêman Zaniyariyê ji Xwedê dixwaze*
1.Qir 3,1-15

1 Û Silêmanê lawê Dawid di qiraletiya xwe de xwurtayiyê dît û Xwedayê wî XUDAN pê re bû û wî zehf mezin kir. 2 Û Silêman ji hemûya Îsraêlê, ji serekên hezaran û sedan re û ji serweran re û li hemûya Îsraêlê ji her yek begî re, ji serokên malên bapîran re got. 3 Û Silêman û tevî wî hemûya civakê çûn cîhê bilind yê ku li Gîbeonê ye; ji ber ku Çadira Civandinê ya Xwedê ya ku Mûsayê qûlê XUDAN li çolê çêkiribû li wir bû.
4 Lê belê Dawid, Sindoqa Xwedê ji Kîryat-Yearîmê, hilkişandîbû cîhê ku jê re ava kiribû; ji ber ku Dawid li Orşelîmê bona wê çadirekê ava kiribû. 5 Û pêşkêşîgeha tûncî ya ku Betsalelê lawê Ûriyê, lawê Hûr wê çêkiribû, li wir, li ber

lacîwerd û kitana tenik û sorê de û di her cûreyên karê qewartinê de û di her tewrê nûvedanê de bi huner e. 15 Û genim û ceh, zeyt û xemra ku efendiyê min gotiye, bila ji koleyên xwe re bişînin 16 û qasî ku ji te re hewce dike, em ê ji Lubnanê onî bibirin û bi kelekan ji behrê heta Yafayê em ê ji te re bînin û tuyê wê hilkişîne Orşelîmê.

17 Û Silêman jî, paşî hejmara ku bavê wî Dawid hemû xerîbên li Îsraêlê ne, jimartiye; wan jimart û sed û pêncî û sê hezar û şeş sed kes hatin dîtin. 18 Û ji wan heftê hezar kesên ku bar dikişînin û heyştê hezarên ku li çiyayan kevir jêdikin û bona ku netewê bixebitînin, bi serkarî sê hezar û şeş sed kesî danî.

*Avakirina Perestgehê*

1.Qir 6; 2.Mûs 36,8-38

3 Û Silêman li çiyayê Moriya, ya ku XUDAN li Orşelîmê, li wir xuyaniyî bavê wî Dawid bûyiye, li ser cîhê bêndera Ornanê Yebûsî de, li cîhê ku Dawid amade kiriye, dest bi avakirina mala XUDAN kir. 2 Û di sala çaremîn ya qiraletiya xwe de, di roja duwemîn ya meha dudiyan de dest bi avakirinê kir. 3 Û bingehên ku bona avakirina mala Xwedê Silêman avêtine vana ne. Dirêjiya wê, bi gezê, li gor pîvana kevin şêst gez[1] û firehiya wê bîst gez. 4 Û dirêjiya eywana ku li ber xanî ye, li gor firehiya xanî, bîst gez û bilindahiya wê sed û bîst û ji hundir ve wê bi zêrê xalis ve girt[2]. 5 Û ji xaniyê mezin re; ji darên selwî tawan çêkir û bi zêrê xalis dor û berên wê xemilandin û li ser wê darên xurme û zincîrên helatî neqişand. 6 Û bona ku xweşik be, bi kevirên biqîmet xanî xemiland û zêr, zêrê Parvaîmê bû. 7 Û rûyên xanî, beştên wê, şêmûgên wê û dîwarên wê û deriyên wê bi zêran ve girtin û kerûbiyan li dîwar ve qewartin.

8 Û xaniyê Cîhê Herî Pîroz çêkir; dirêjiya wê li gor firehiya xanî bîst gez bû û firehiya wê bîst gez û rûyê wê bi qasî şeş sed talant[3] zêrê xalis ve girt. 9 Û giraniya bizmaran pêncî şekel zêr bû. Û rûyê odeyên li jor in bi zêr ve girt.

10 Û di xaniyê Cîhê Herî Pîroz de, karê peykerteraş du kerûbî çêkirin û rûyên wan bi zêr ve girtin.

11 Û dirêjiya bazikên kerûbiyan bîst gez bûn, bazikekî kerûbî pênc gez bû, digihaşt dîwarên xanî û bazikê din jî pênc gez bû, digihaşt bazikê kerûbiyên din.

12 Û bazikekî kerûbiyê din pênc

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Xemiland.
3 Li rasteka menan binêrin.

gez bû, digihaşt dîwarên xanî û bazikê din jî pênc gez bû, digihaşt bazikê kerûbiyên din. 13 Û bazikên van kerûbiyana bîst gezî vedigirtin û kerûbiyan li ser pêlan disekiniyan û wecên wan berbi malê hatibû zîvirandin. 14 Û perdê ji lacîwerdê û ji erxewaniyê û ji sorê û ji kitana tenik ve çêkir û li ser wan ve kerûbiyan neqişandin.
15 Û li ber xanî, di dirêjiya sîh û pênc gezî de du sitûnî çêkirin û serîkê li ser herduyan pênc gez bûn.
16 Û li oda navîn zincîran çêkirin û wan danîn ser sitûnan û sed hinarî çêkirin û wan danîn ser zincîran.
17 Û sitûnan, wekî yek li rastê û yê din jî li çepê li ber perestgehê çikandin û navê Yakîn[1] li yê rastê û navê Boaz[2] li yê çepê kirin.

*Alavên Perestgehê*

1.Qir 7,23-39; 2.Mûs 37,17-38,20

**4** Û ji tûncê ve pêşkêşîgehekê çêkir; dirêjiya wê bîst gez û firehiya wê bîst gez û bilindahiya wê deh gez. 2 Û behra rijandî ji qeraxekê heta qeraxa din, bi giroverî, deh gezî çêkir û bilindahiya wê pênc gez bû û benekî sîh gezî li dora wê geriyayî bû. 3 Û di bin wê de, yê ku dorûberê wê girtine, di her gavî de deh sûretên girêkên ku hemûya dora behrê girtine hebûn. Girêk du rêz bûn û dema hate rijandin, pev re hatin rijandin. 4 Li ser donzdeh gayî disekinî, sê heb li bakur û sê heb li rojava û sê heb li başûr û sê heb li rojhilatê dinêriyan û behrê ji jor ve danîbûn ser wan û newqa hemûyan ber bi hundir ve bû.
5 Û qalindiya wê lepek[3] bû û qeraxa wê mîna qeraxa tasekê, mîna çîçega leylankê hatibû neqişandin û hundirê wê sê hezar bat avê digirt. 6 Û deh qazanî çêkir û bona ku di wan de şuştinê bike, pênc hebî danîn aliyê rastê û pênc hebî danîn aliyê çepê; tiştên ku dê bibûna pêşkêşiyên şewitandinê di hundirê wan de duşiştin; lê belê behr bona şuştina kahînan bû.
7 Û deh şimadankê zêrîn li gor zagonên wan çêkirin û wekî pênc heb li aliyê rastê û pênc heb jî li aliyê çepê bin, wan danîn perestgehê. 8 Û deh heb mase çêkirin û wekî pênc heb li aliyê rastê û pênc heb jî li aliyê çepê bin, wan danîn perestgehê. Û ji zêr ve sed heb legan çêkirin. 9 Û hewşa kahînan û hewşa mezin û deriyên hewşê çêkirin û rûyên deriyên wan bi tûncê ve girtin. 10 Û behrê danî aliyê rastê malê, ber bi başûrî rojhilatê.
11 Û Hûram beroşan, bêran û leganan çêkir.

[1] Dê bizeximîne.
[2] Hêz di vê de ye.
[3] Li rasteka menan binêrin.

Û Hûram, karên ku bona qiral
Silêman di mala Xwedê de çêki-
rine, 12 du sitûnî û giroverikan û
du serîkên li ser sitûna ne û her
du giroverikên ku li ser her du
serîkên li ser sitûnan û karên torê
ên ku li ser her du giroverikên ku
li ser her du serîkên li ser her du
sitûna ne 13 û bona karê torê çar
sed hinarî û bona her karê torê ên
ku her du giroverikên ku li ser her
du serîkên li ser her du sitûna ne
duxumînin, du rêz hinarî qedand.
14 Û lingdankan û li ser ling-
dankan qazanan çêkir; 15 behrekê
û donzdeh gayên ku di bin wê de ne
çêkir. 16 Û Hûram-Avîm, bona qi-
ral Silêman, bona mala XUDAN,
beroşan û bêran û çanqilên goşt û
hemû firaxên wan ji tûncê ku di-
biriqe çêkir. 17 Qiral vana di teja-
neya Urdunê de, di axa herî ya ku
di navbera Sûkkot û Tsereyayê de
yî rijand. 18 Û Silêman ji hemûya
van feraxan gellek tiştî çêkir û li
wezna tuncê nehat gerîn.
19 Û Silêman, hemû feraxên di
mala Xwedê de ne û pêşkêşîgeha
zêr û sifreyên ku li ser wan nanê
aramiyê hene 20 û bona ku li gor
ûsilê, li ber odeya navîn bişewite
ji zêrê xalis qendîlan û tevî wan
şimadankan 21 û ji zêr – ev jî ji
zêrê xalis – çîçegan û qendîlan
û maşeyan 22 û ji zêrê xalis me-
qesan û leganan û kevçiyan û
tawleyan çêkir. Û deriyê xanî jî,
bazikên deriyê hundirîn, yên ku
bi Cîhê Herî Pîroz ve vedibûn û
bazikên xanî û perestgehê ji zêr
bûn.

*Sindoqa Peymanê tînin Perestgehê*
1.Qir 8,1-11

5 Û bona mala XUDAN, hemû
karên ku Silêman çêkir qedi-
yan. Û Silêman; tiştên ku bavê wî
Dawid wan tirxan kiriye, zîvê û
zêrê û hemû taximan anî hundir
û wan danî nav xezîneyên mala
Xwedê.
2 Wê gavê Silêman, kalepîrên Îs-
raêlê û hemû seriyên nîjadan û se-
rokên mala bapîrên lawên Îsraêl,
bona ku' Sindoqa Peymanê ya
XUDAN ji bajarê Dawid Siyonê
hilkişîne jor, li Orşelîmê civand.
3 Û hemû mêrên Îsraêlê, di cejna
ku di meha heftemîn de ye li cem
qiral civiyan. 4 Û hemû kalepîrên
Îsraêlê hatin û Lêwiyiyan Sindo-
qê rakirin 5 û Sindoqê û Çadira
Civandinê û hemû taximên pîroz
ên ku di Çadirê de ne, anîn jorê;
kahînan û Lêwiyiyan vana anîn
jor. 6 Û qiral Silêman û hemû ci-
vaka Îsraêlê ya ku li cem wî ne li
ber Sindoqê bûn, ga û mîhên ku
di pirraniyê de nayên jimartin û
hisêb kirin, qurban dikirin. 7 Û
kahînan Sindoqa Peymanê ya
XUDAN anîn hundir, cîhê wê,
odeya navîn, Cîhê Herî Pîroz, anîn
bin bazikên kerûbiyan. 8 Ji ber ku

kerûbiyan bazikên xwe bi ser cîhê
Sindoqê ve vekiribûn û kerûbiyan
Sindoqê û mircaqên wê ji jor ve
duxumandin. 9 Û mircaq ewqasî
dirêjbûn ku, serê mircaqan, li ber
odeya navîn ji Sindoqê wêdetir
dihatin xuyanî kirin; lê belê ji der-
ve nedihatin xuyanî kirin û heta
îrojê li wir in. 10 Dema lawên
Îsraêl ji Misirê ve derketin, di çi-
yayê Horebê ya ku XUDAN bi
wan re peymanê danîbû de, xeynî
her du lewhayên ku Mûsa xistibû
hundirê wê, tiştekî din tunebû.
11 Û wusa bû ku, dema kahînan
ji cîhê pîroz ve derketin – ji ber
ku kahînên ku li wir amade bûn,
li dorê nenihêrtîbûn û hemûyan
xwe pîroz kiribûn; 12 Lêwiyi-
yên qesîdevan in jî gişt, Asaf,
Heman, Yedûtûn û lawên wî û
birayên wî, wekî kitanê tenik li
xwe kiribin, bi zîlan û santûran
û çenkan li niçîka rojhilatê ya
pêşkêşîgehê sekinîn û tevî wan
sed û bîst kahîn li boriyê dixistin
– 13 û wusa bû ku, borîjenan û
qesîdevanan, bona ku di şikirî
û hemdkirina XUDAN de bête
bihîstin, wekî ku yek be, tenê
dengekî derxînin bi boriyan û
zîlan û bi sazan ve dengê xwe bi-
lind kirin, ji XUDAN re hemd ki-
rin û gotin: Ji ber ku ew qenc e; ji
ber ku xêra wî abadîn e; wê gavê
xanî, xaniyê XUDAN, bi ewr ve
tijî bû 14 û ji ber ewrê kahînan
bona xizmetê hêz neanîn ku bise-
kinin; ji ber ku mezinahiya XU-
DAN, mala Xwedê dagirtibû.

*Gotara ku Silêman ji gel re dibêje*

1.Qir 8,12-21; 1.Dîr 17

6 Wê gavê Silêman got: XU-
DAN: Ez di reşetariyê de rû-
dinim gotiye. 2 Lê belê bona ku
tu rûne, ji te re xaniyekî û cîhekî
ku tu abadîn bi şunwarî bimîne
ava kirim. 3 Û qiral wecê xwe
zivirand û hemûya civaka Îsraêlê
pîroz kir û hemûya civaka Îsraêlê
bi peyatî sekinîbûn.
4 Û got: Bila Xwedayê Îsraêlê XU-
DANê ku bi devê xwe ji bavê min
Dawid re gotiye û bi destên xwe
ve aniye cîh pîroz be; wî gotiye:
5 Ji roja ku netewa xwe ji welatê
Misirê ve derxistime, bona ku navê
min li wir be, bona xaniyek avaki-
rinê, ji hemûya nîjadên Îsraêlê ve
bajarekî nebijartim; bona ku li ser
netewa min Îsraêlê bibe serwer,
qet tu zilamekî jî nebijartim; 6 lê
belê bona ku navê min li wir be,
Orşelîmê bijartim û bona ku li ser
netewa min Îsraêlê be, Dawid bi-
jartim. 7 Û bona Xwedayê Îsraêlê
XUDAN xaniyekî avakirin, di dilê
bavê min Dawid de bû. 8 Lê belê
XUDAN ji bavê min Dawid re got:
Madem ku te bona navê min ava-
kirina xaniyekî xistiye dilê xwe, te
bi xistina dilê xwe baş kiriye; 9 lê
belê tuyê xaniyê çêneke; lê lawê te

yê ku ji dola te derkeve, dê ji navê min re wî xaniyê çêbike! 10 Û XUDAN gotina ku gotiye aniye cîh; ji ber ku ez li cîhê bavê xwe Dawid sekinîme û mîna ku XUDAN wad kiriye ez li texta Îsraêlê rûdinim û ji navê XUDAN, Xwedayê Îsraêlê re xanî ava kirim. 11 Û Sindoqê danîm holê, peymana ku XUDAN bi lawên Îsraêl re çêkiriye di nav wê de ye.

*Duaya Silêman*

1.Qir 8,22-53

12 Û li ber pêşkêşîgeha XUDAN, li ber hemûya civaka Îsraêlê sekinî û destên xwe vekir. 13 Ji ber ku Silêman, lengergehekî dirêjiya wê pênc gezî û firehiya wê pênc gezî û dirêjiya wê sê gezî ji tûncê ve çêkiribû û wê danîbû nava hewşê û li ser wê disekinî û li ber hemûya civaka Îsraêlê, li ser çongên xwe rûnişt û destên xwe ber bi ezmanê ve vekir 14 û got: Ya XUDAN, Xwedayê Îsraêlê! ne li ezman û ne li erdê mîna te Xwedê nîne; tu bi qûlên xwe yên ku bi hemûya dilên xwe li ber te dimeşin xêr û peymanê digire; 15 te bi ya ku ji bavê min Dawid, qûlê xwe re wad kiribû girt; belê, te bi devê xwe got û mîna ku îroj wusa ye bi destê xwe ve anî cîh. 16 Û niha, ya XUDAN, Xwedayê Îsraêlê, wekî ku te ji bavê min Dawid re: Mîna ku tu li ber min dimeşe, bona ku di zagona min de bimeşin tenê lawên te balkêşiyê li rêyên xwe bikin, bona ku di texta Îsraêlê de rûnê dê ji ber min zilamekî te kêm nebe gotibû, niha bi gotina xwe bigire! 17 Û niha, ya XUDAN, Xwedayê Îsraêlê, bila gotina ku te ji qûlê xwe Dawid re gotiye rast derkeve!

18 Lê belê ma Xwedê bi rastî li erdê, tevî zilaman ve rûdinê? A vay, ezman û ezmanê ezmanan nikare te bi cîh bike[1]; ka li ku maye xaniyê ku ava kirim! 19 Lê belê ya XUDAN, Xwedayê min, bona ku tu dua û hawarên vî qûlê te li ber te dike bibihîze, berê xwe bide dua û lavayên vî qûlê xwe; 20 da ku, bona bihîstina duaya ku vî qûlê te ber bi vî şûnda ve dike, bila li vî xaniyî, cîhê ku te gotiye ku ez ê navê xwe deynim wê, bila bi şev û roj çavên te vekiribin. 21 Û gava ber bi vî cîhî dua bikin, lavayên vî qûlê xwe û netewa xwe Îsraêlê bibihîze û ji şunwara xwe, ji ezmanê ve bibihîze û dema tu bibihîze, lêborînê bike!

22 Ger zilamek li dijî cîranê xwe sûcê bike û bona ku sondê bide, sondekê lê bikin û ger were û li vî xaniyî, li ber vê pêşkêşîgehê sondê bixwe; 23 wê gavê ji ezman ve bibihîze û bike û bona ku rêya yê xerab bîne serê wî, wekî ku berdêla wî bide wî û bona ku ji salih re, li gor

1 Bigire hundirê xwe, an jî: Têra te nakin.

baweriya wî bidê, wî bi heq derxîne
û daraziyê ji qûlên xwe re bike.
24 Û ger netewa te Îsraêl ji ber
ku li hember te kirina sûcê li ber
neyar xera bibin û dîsa vegerin û
navê te bi bîr bînin[1] û ger li vî xa-
niyî, li ber te dua bikin û lavayan
bikin; 25 wê gavê ji ezman ve bi-
bihîze û gunehê netewa xwe Îsraêlê
lê biborîne û wan dîsa bîne welatê
ku te dabû wan û bavên wan.
26 Ger ji ber ku li dijî te sûc kirine
ezman neyê girtin û baran nebe û
ber bi vî cîhî dua bikin û ger navê
te îqrar bikin û gava tu wan kêm
bike, ji sûcên xwe vegerin; 27 wê
gavê li ezmanan bibihîze û sûcê
qûlên xwe, yên netewa xwe Îs-
raêlê li wan biborîne ku, tu rêya
qenc ya ku dê tê de bimeşin hînî
wan bike û baranê bide welatê ku
te bi mêrasî daye netewa xwe!
28 Ger li welêt xela bibe, weba
bibe, ger bayê samê, an jî kufikîbûn,
kullî, an jî maşot bibe; ger li welatên
ku bajarên wan lê ne, neyar dorê li
wan bigire; dixwaze kîjan asîw û
nexweşî bibe, bila bibe; 29 ji aliyê
zilamekî her yek ji nav zilaman; an
jî ji aliyê hemûya Îsraêl ya netewa te
duayek an jî lavayek hebe, her kes bi
asîwa xwe û derdê xwe bizanibe û
destên xwe ber bi vî xaniyî ve veke;
30 wê gavê ji ezman, ji şunwarê
xwe ve bibihîze û lê biborîne û ji
her zilamê ku tu bi dilê wî ve di-
zane, li gor hemû rêyên wî bide; ji
ber ku tu bi dilê mirovan, tenê tu pê
dizanî; 31 da ku, heta li warê ku te
dayiye bapîrên me rûnin, bona ku
di rêyên te de bimeşin, bila ji te bi-
tirsin.
32 Û biyanê ku ne ji netewa te Îs-
raêlê ye jî, ji ber navê te yî mezin
û destê te yî bi qudret û bazûya te
yî dirêjkirî, gava ji welatê dûr ve
werin û dema ber bi vî xaniyî dua
bikin; 33 wê gavê ji ezmanan, ji
şunwara xwe ve bibihîze û li gor
hemû tiştên ku yê biyan ji te re fer-
yadê dike; bike, da ku, hemû ne-
tewên dinê; mîna netewa te Îsraêl
bila navê te binasin û ji te bitirsin û
bila bizanibin, vî xaniyê ku ava ki-
rime, bi navê te ve tête bang kirin[2]!
34 Ger netewa te, ji rêyekî ku tu
wan bişînî, bona cengê derkevin
hemberê neyarên xwe û ji te re, ji
vî bajarê ku te hilbijartiye re û ber
bi vî xaniyê ku bona navê te ava
kirime re dua bikin; 35 wê gavê
dua û lavayên wan ji ezmanan ve
bibihîze û doza wan bibîne.
36 Ger li dijî te sûcê bikin – ji ber,
zilamê ku sûc neke nîne – û tu li
dijî wan hêrs bibe û wan bide destê
neyar û yên ku wan sirgûn dikin,
dixwaze bila nêzîk be an jî dûr be,
wan ber bi aliyekî bajon; 37 lê belê
li cîhê ku hatine sirgûn kirin bifiki-

[1] Bibêjin, bînin ser zimên: an jî: Îqrar bikin.
[2] Tête nasîn.

rin û ger dîsa bizivirin û bi gotina: Me sûc û rêşaşî û xerabiyê kirin ji cîhê sirgûniyê li ber te bigerin 38 û li cîhê sirgûniya ku wan sirgûn kirine bi hemûya dilên xwe û bi hemûya canên xwe ji te re vegerin[1] û ber bi welatê ku te dayiye bapîrên wan û vî bajarê ku te hilbijartiye û vî xaniyê ku bona navê te ava kirime dua bikin; 39 wê gavê ji ezman, ji şunwara xwe dua û lavayên wan bibihîze û doza wan bibîne û li netewa xwe, ya ku li dijî te sûc kirine, biborîne.
40 Niha, ya Xwedayê min, ez lava dikim, bila vê duaya ku li vî cîhî hatiye kirin çavên te bibînin û guhên te bibihîzin! 41 Û niha ya XUDAN, Xwedê, hilkişe cîhê xwe yî rehet, tu û Sindoqa qudreta te! Ya XUDAN, Xwedê, bila kahînên te bi xelasiyê li xwe bikin û qûlên te yî dilsoz, bila bi qenciyê ve kêfxweş bibin! 42 Ya XUDAN, Xwedê, wecê mesîhê xwe şunda venegerîne; xêrên xwe yên ku te ji qûlê xwe Dawid re kiriye, di bîra xwe de bîne!

*Nezîrkirina Perestgehê*

7 Û gava Silêman dua xwe qedand, agir ji ezman ve daket û pêşkêşiya şewitandinê û qurbanan xwar û qedand û mezinahiya XUDAN hundirê malê tijî kir. 2 Û kahînan hêz neanîn ku têkevin mala XUDAN, ji ber ku mala XUDAN, bi mezinahiya XUDAN ve tijî bû. 3 Û dema agir hîn dadiket û dema mezinahiya XUDAN li ser malê bû, hemûya lawên Îsraêl di nêrînê de bûn û bi ser wecê xwe, li ser raxêra kevir ve xwe avêtin erdê û secde kirin û bi gotina: Ji ber ku ew qenc e; ji ber ku xêra wî abadîn e! şikiryê ji XUDAN re kirin.
4 Wê gavê qiral û hemûya netewê li ber XUDAN qurbanan serjê kirin. 5 Û qiral Silêman, bi qurbantî bîst û du hezar heb ga û sed û bîst hezar mîh pêşkêş kir. Bi vî awayî qiral û hemûya netewê mala Xwedê tirxan' kirin. 6 Û kahînan li ser wezîfeyên xwe sekinîn; Lêwiyiyan jî bi haletên mûsikiyê ên XUDAN, yên ku qiral Dawid, bona ku şikiryê ji XUDAN re bike, ji ber ku xêra wî abadîn e, ji bo bi wan re hemdê bike çêkiriye sekinîn û kahînan li hemberî wan li boriyan xistin û hemûya Îsraêlê li ser pêlan disekiniyan. 7 Û Silêman nava hewşa li ber mala XUDAN e pîroz kir; ji ber ku pêşkêşiyên şewitandinê û dona pêşkêşiyên xweşiyê li wir pêşkêş kirin, ji ber, pêşkêşiya tûncî ya ku Silêman çêkiribû, pêşkêşiya şewitandinê û pêşkêşiya nan û donê negirt[2].
8 Di wê demê de Silêman, bi

1 Ji te re bizivirin.

2 Ji wan re qîm nekir, teng hat.

hemûya Îsraêlê, ji cîhê ketina Ha-
matê, heta newala Misirê, bi ci-
vatekî zehf mezin ve bi vî awayî
heft roj cejnê kir. 9 Û di roja
heyştemîn de civîna pîroz çêkirin;
ji ber ku heft roj tirxana pêşkêşiyê
pîroz kirin û heft rojê jî cejnê
pîroz kirin. 10 Û ji ber qenciya ku
XUDAN ji Dawid re û ji Silêman
re û ji netewa xwe Îsraêlê re ki-
riye, bi kêfxweşî û dilqenciyê ve
netewê di roja bîst û siseya meha
heftan de şandin çadirên wan:

*Xudan xwe dîsa nîşanî Silêman dide*
1.Qir 9,1-9

11 Û Silêman mala XUDAN û
mala qiral qedand û hemû tiştên
ku bona di mala XUDAN de û di
mala xwe de hatine dilê wî, bi ser-
firaziyê ve çêkir. 12 Û XUDAN,
şevê xwe nîşanî Silêman da û jê
re got: Duaya te bihîstim û vê derê
ji xwe re wekî mala qurbanê hil-
bijartim. 13 Ger ez ezmanan bigi-
rim û baran nebe, ger bona ku erdê
bixwe û biqedîne emir bidim kullî
û webayê bişînim nav netewê,
14 ger netewa min ya ku bi navê
min tên bang kirin, xwe nizm bikin
û bi dua kirinê li wecê min bigerin
û ji rêyên xwe yî xerab vegerin; wê
gavê ez ê ji ezmên ve bibihîzim û
ez ê li sûcên wan biborînim û ez
ê tendrustiyê bidim welatên wan.
15 Niha duaya ku li vir bête kirin,
dê çavê min bibînin û guhên min
bibihîzin. 16 Û bona ku abadîn
navê min li wir be, niha vî xaniyî
bijartim û pîroz kirim û dê çavên
min û dilê min di hemûya rojan de
li wir be. 17 Û tu, ger mîna ku bavê
te Dawid li ber min meşiyaye, tu
jî bimeşe û li gor heçiyên ku ji te
re emir kirime, bike û bi darazî û
zagonên min ve bigire; 18 wê gavê
mîna ku bi gotina: Bona ku li ser
Îsraêlê serweriyê bajo, dê ji te zila-
mek kêm nebe bi bavê te Dawid re
peymanê danîme, ez ê texta qirale-
tiya te bizexmînim!
19 Lê belê ger hûn çewt bibin û
dev ji zagon û emirên min ên ku
danîme ber we, berdin û herin û
ji îlahên din re qûlitiyê bikin û
ji wan re peristinê bikin; 20 wê
gavê ez ê wan ji welatê ku dayî-
me wan, rahêlim û bavêjim û vî
xaniyê ku ji navê xwe re pîroz
kirime, ji ber xwe ve bavêjim
û ez ê vî di nava hemû netewan
de bikim qerfokî û methelok.
21 Û dê her kesê ku ji ber vî xa-
niyê ewqasî bilind e, derbas bibin
şaş û metal bibin û bibêjin: Ma
çima XUDAN ji vî welatî û ji vî
xaniyî re wusa kiriye? 22 Û dê
bibêjin: Ji ber ku dev ji Xwedayê
bapîrên xwe XUDAN, ê ku wan
ji welatê Misirê ve derxistiye ber-
dan û bi îlahên wekî din girtin û
ji wan re peristinê kirin û ji wan
re qûlitiyê kirin; ji ber vê yekê
hemûya vê xerabiyê anî serê wan!

*Çalakiyên din ên Silêman*

1.Qir 9,10-28

8 Û wusa bû, paşî ku Silêman
mala XUDAN û mala xwe di
bîst salî de ava kir, 2 Silêman, ba-
jarên ku Hûram dayîne Silêman
ava kir û lawên Îsraêl di wan de
bi cîh kir[1].
3 Û Silêman çû Hamat-Tsobayê û
wî bi bin ve xist[2]. 4 Û hemû ba-
jarên xwe yên embarê, ên ku li
Hamat û Tadmora ku li çolê ne
çêkirine ava kir. 5 Û Beyt-Horona
jorîn û Beyt-Horona jêrîn, bajarên
bi dîwar, bi dîwaran û bi deriyan
û bi zendan ve çêkir 6 û Baalatê û
hemû bajarên embarê ên Silêman
û bona erebeyên xwe hemû ba-
jaran û bona siwarên xwe bajaran
û Silêman li Orşelîmê û li Lub-
nanê û li hemû warên welatê xwe,
tiştên ku dixwest bona zewqa xwe
çêbike, hemûyan çêkir.
7 Û gava em bên li netewa ku ji
ber Hîttî û Amorî û Perîzzî û Hîvî
û Yebûsiyên ku ne ji Îsraêlê ne
mayîne; 8 ji zarokên wan ku paşî
wan li welêt mayîne, ên ku lawên
Îsraêl wan neqedandine, mîna ku
îro jî wusa ye, Silêman koleyên
suxrekar da hev. 9 Lê belê Silêman,
ji lawên Îsraêl, bona karê xwe kes
nekir kole; lê vana zilamên cengê û
serokên cengewarên erebê û serokê
erebe û siwarên wan bûn. 10 Û van
serokên ku qiral Silêman wan wezî-
fedar kiriye, du sed û pêncî kes bûn
û çavdêriyê li netewê dikirin.
11 Û Silêman, qîza Fîrawûn ji
bajarê Dawid ve, bona xaniyê ku
bona wê ava kiriye derxist; ji ber
ku got: Bila jina min li mala qiralê
Îsraêlê Dawid de rûnenê, ji ber ku
ew cîhên ku Sindoqa XUDAN
hatinê pîroz in.
12 Wê gavê Silêman, li ser
pêşkêşiya XUDAN ya ku li ber
eywanê çêkiribû, pêşkêşiyên
şewitandinê ji XUDAN re pêşkêş
kir. 13 Di Sebtan de û di serê me-
han de û di salê sê carî, di cejnên
eşkere de, di cejna nanê bêhavên
de û di cejna hefteyan de û di cej-
na haymeyan de, wekî karê her
rojî, li gor emrê Mûsa pêşkêş kir.
14 Û li gor daraziya bavê xwe
Dawid taximên kahînan li gor xiz-
metên wan û bona ku karê her rojî,
di roja xwe de bibe ji bo hemdê û
bona ber kahînan xizmetê Lêwi-
yiyan bi wezîfeyên wan ve, der-
gevanan jî li gor taximên wan, ji
her deriyî wezîfedar kir; ji ber ku
zilamê Xwedê, Dawid bi vî awayî
emir dabû. 15 Û di derheqê her
karî de û di derheqê xezîneyan de
ji emrê ku qiral daye kahînan û
Lêwiyiyan neqetiyan.
16 Û heta roja bingehî danîna
mala XUDAN û heta qedandina

1 Û li wan bajaran dan rûniştandin.

2 Li dijî wî serfiraz hat, an jî: Wî mexlûb kir.

wê her karê Silêman hate amade
kirin. Bi vî awayî mala XUDAN
hate temam kirin.
17 Û Silêman çû Etson-Geberê
û Elota li ber qeraxa behrê, ya li
warê Edomê ye. 18 Û Hûram bi
destê koleyên xwe jê re keştiyan
û koleyên ku bi behrê ve diza-
nin şand û tevî koleyên Silêman
gîhaştin Ofîrê û ji wir çar sed û
pêncî talant zêr stendin û wê ji qi-
ral Silêman re anîn.

*Qiralîçeya Şebayê*

1.Qir 10,1-13; Met 12,42

9 Û dema qiralîçeya Şebayê,
nav û dengê Silêman bihîst,
bona ku li Orşelîmê Silêman bi
tiştonekan biceribîne, bi alayiyek
mezin û bi deveyên ku bi biharat
û bi zehf zêr û kevirên bi qîmet
ve barkirî hat û hat cem Silêman
û ji bo hemû tiştên ku di dilê wê
de ne bi wî re axifî. 2 Û Silêman
bersivê da hemû pirsên wê; bona
Silêman, tiştekî dizî, ê ku bersivê
nedaye pîrekê tunebû. 3 Û dema
qiralîçeya Şebayê, zanyariya Silê-
man û xaniyê ku ava kiriye û xwa-
rina sifra wî û rûniştina qûlên wî û
sekinîna xizmetkarên wî û kincên
wan, 4 meygerên[1] wî jî û kincên
wan û pêlika ku pê hildikişe mala
XUDAN dît, êdî pê re can nema.
5 Û ji qiral re got: Gotina ku bona
karên te û bona zanyariya te di
welatê xwe de bihîstime bi xwe
rast e! 6 Û heta ku hatim û çavên
min wan dîtin, ez bi gotina wan
ve bawer nebûbûm û a vay, nêvi-
yê zanyariya te jî ji min re nehati-
ye agahî dayîn û tu ji nav û dengê
ku hatiye guhê min bilindtir î!
7 Zilamên te çi dilgeş in, ev kole-
yên te jî çi dilgeş in, her tim li ber
te disekinin û zanyariya te dibihî-
zin! 8 Bila Xwedayê te XUDAN,
Xwedayê te XUDANê bona ku tu
di oxra wî de bibe qiral, bona ku
te li ser texta xwe deyne rûniştinê
ji te razî ye, pîroz be; ji ber ku
Xwedayê te, bona abadîn Îsraêlê
bizexmîne ji wan hez kir, ji ber
vê yekê bona ku tu heq û rastiyê
bike, te li ser wan kiriye qiral.
9 Û sed û bîst talant zêr û zehf
biharat û kevirên bi qîmet da qi-
ral û mîna biharata ku qiralîçeya
Şebayê daye qiral Silêman tune
bû. 10 Û koleyên Hûram û ko-
leyên Silêman, yên ku ji Ofîrê
zêr anîne jî darên belemê û ke-
virên biqîmet anîn. 11 Û qiral,
bona xaniyê XUDAN û bona
xaniyê qiral, ji darên belemê pêli-
kan û bona mûsîkîvanan çenk û
santûran çêkir û li warê Cihûda,
heta wê rojê mîna vêya nehat
dîtin. 12 Û qiral Silêman, ji tiştên
ku qiralîçeya Şebayê ji qiral re
aniye zêdetir, hemû xwesteka wê,
hemû daxwaziya wê da wê. Û qi-

[1] Sakiyên wî.

ralîçe tevî koleyên xwe vegeriya
û çû welatê xwe.

*Dewlemendiya Qiral Silêman*

1.Qir 10,14-29; 11,41-43

13 Û wezina zêrê ku di salekê de
ji Silêman re hatiye, xeynî zilamên
danûstendinê dikin û xeynî yên
bazirganan anîne, şeş sed û şêst û
şeş talant zêr bû 14 û hemû qiralên
Ereban û waliyên welêt jî, zêr û
zîv ji Silêman re dianîn. 15 Û qiral
Silêman, ji zêrê kutayî ve du sed
mertalên mezin çêkir û ji mertalekî
mezin re şeş sed şekel zêrên kutayî
çûn[1]. 16 Û ji zêrê kutayî ve sê sed
mertalên biçûk çêkir û ji mertalekê
re sê sed şekel zêrên kutayî çûn
û qiral vana danî mala daristana
Lubnanê. 17 Û qiral ji diranê fîlan
textekî mezin çêkir û rûyê wê bi
zêrê safî ve girt. 18 Û şeş pêlik û
îskemleyak zêrîn ya lingan ên tex-
tê hebûn û vana bi text ve girêdayî
bûn û li her du aliyê cîhên rûniştinê
mil hebûn û li ber milan şêr dise-
kinîn. 19 Û li ser şeş pêlikî, li her
du aliyê wê, donzdeh şêr disekinîn;
li qet tu welatî tiştekî wusa neha-
tibû çêkirin. 20 Û feraxên vexwa-
rinê ên qiral Silêman gişt ji zêran û
hemû feraxên mala daristana Lub-
nanê gişt ji zêrê safî bûn; di rojên
Silêman de zîv ji tu tiştî ve nedihat
hesêb kirin. 21 Ji ber ku keştiyên
qiral ên ku tevî koleyên Hûram
diçin Tarşîşê hebûn; keştiyên
Tarşîşê, di sê salî de carekî bi zêr
û zîv û diranê fîlan û meymûnan û
teyrên tawis ve barkirî dihatin.
22 Û qiral Silêman di dewlemen-
dî û zanyariyê de ji hemû qiralên
dinê ve hîn jî mezintir bû. 23 Û
bona zanyariya ku Xwedê xisti-
ye dilê Silêman bibihîzin, hemû
qiralên dinê li wî digeriyan. 24 Û
her yek ji wan, ji salê heta salê xe-
lata xwe, wekî nerxa salnameyî be
feraxên zîv û feraxên zêr û kincan,
çekan û biharat, hespan û qantiran
dianîn. 25 Û bona hespan û ere-
beyên cengê çar hezar heb axurên
Silêman hebûn û donzdeh hezar
siwarên wî hebûn, wan danîn
bajarên erebeyan û cem qiral,
Orşelîmê. 26 Û ji çemê Feratê heta
warê Filistiyan û heta sînorê Mi-
sirê, li ser hemû qiralan serweriyê
ajot. 27 Û qiral, zîvê li Orşelîmê
daxist dereca kevir û darên erzê
jî kir mîna darên hêjîra bejik, yên
ku bi pirranî li Şefelayê ne. 28 Û
ji Misirê û ji hemû welatan, bona
Silêman hespan anîn.

*Mirina Qiral Silêman*

29 Û ma karên Silêman ên li şunda
mayîne, karên wî yên pêşîn jî
karên paşîn jî di gotinên peyxam-
ber Natan de û di peyxambertiya

*1* Di giraniya şeş sed şekel zêrên kutayî de, kêm-zêde 6.9 kg.

Ahiyayê Şîloyî de û di peyxamên
Îddoyê ku Dibîne de, ên ku di
derheqê Yeroboamê lawê Nebat
in de, ne nivîsandîne? 30 Û Silê-
man, li Orşelîmê li ser hemûya
Îsraêlê çel sal qiraletiyê kir. 31 Û
Silêman tevî bapîrên xwe raket û
li bajarê bavê xwe Dawid de hate
binax kirin û li dêvila wî, lawê wî
Rehoboam bû qiral.

*Îsraêl li dijî Rehoboam serî hildide*
1.Qir 12,1-19

10 Û Rehoboam çû Şekemê;
ji ber ku hemûya Îsraêlê,
bona ku wî bikin qiral hatibûn
Şekemê. 2 Û wusa bû ku, dema
Yeroboamê lawê Nebat bihîst, –
ji ber ku ew bi xwe li Misirê bû,
ji ber qiral Silêman reviyabû wê
derê –, Yeroboam ji Misirê vege-
riya. 3 Û şand û bangî wî kirin û
Yeroboam û hemûya Îsraêlê ha-
tin. Û bi Rehoboam re axifîn û jê
re gotin: 4 Bavê te nîrê me dijwar
kir û xizmeta bavê te yî dijwar û
nîrê wî yê giran ê ku daniye ser
me, niha tu sivik bike û em ê ji
te re koletiyê bikin. 5 Û ji wan re
got: Piştî sê roja dîsa werin cem
min. Û netewe çûn.
6 Û qiral Rehoboam bi zilamên
kalepîr, ên ku dema di tenduristi-
ya qiral Silêman de li ber wî se-
kinîbûn re şêwirî: Gelo bona ku
ez bersivê bidim vê netewê, hûn
ê çi şîretê bidin min? 7 Û pê re
axifîn û gotin: Ger tu bi qenciyê
ji vê netewê re bike û tu dilê wan
rahêle û gotinê baş ji wan re bi-
bêje, dê her tim ji te re bibin kole!
8 Lê belê dev şîreta ku zilamên
kal dabûnê berda û bi zilamên ci-
wan ên ku bi wî re mezin bûne û
li ber wî disekinin re şêwirî. 9 Û
ji wan re got: Gelo hûn ê çi şîretê
bidin? Û ka em çi bersivê bidin
vê netewa ku bi gotina: Nîrê bavê
te daniye ser me sivik bike lava
ji min re dikin? 10 Û zilamên ci-
wan ên ku pê re mezin bûne, pê re
axifîn û jê re gotin: Tuyê ji nete-
wa ku bi gotina: Bavê te nîrê me
giran kir, lê belê tu wê ji me re
sivik bike bi te re axifîne re wusa
bibêje: Tilîka min ya biçûk ji pişta
bavê min qalindtir e! 11 Û niha,
ger bavê min nîrê giran li we bar
kiribe, ez ê bi ser nîrê we zêdetir
bikim; bavê min we bi qamçiyan
perwerde kir; lê belê ez ê we bi
tûpişkan ve perwerde bikim; tuyê
bi vî awayî bi wan re biaxife.
12 Û mîna gotina qiral, ya ku: Di
roja sêwemîn de dîsa werin cem
min gotibû, Yeroboam û hemûya
netewê di roja sêwemîn de hatin
cem Rehoboam. 13 Û qiral bersi-
va tund da wan û qiral Rehoboam
dev ji şîreta zilamên kal berda
14 û li gor gotina zilamên ciwan
bi wan re axifî û got: Bavê min
nîrê we giran kir; lê belê ez ê bi
ser wê ve bixim; bavê min we bi

qamçiyan perwerde kir; lê belê
ez ê we bi tûpişkan ve perwerde
bikim! 15 Û qiral netewe guhdarî
nekir; ji ber bona XUDAN, gotina
ku bi navdîtiya Ahiyayê Şîloyî ji
Yeroboamê lawê Nebat re gotiye
bizexmîne, ev vegerandin ji aliyê
Xwedê ve bû.
16 Û hemûya Îsraêlê dema dîtin
ku qiral wan guhdarî nake, nete-
we bersivê dan qiral û gotin: Ma
di Dawid de çi para me heye? Û
di lawê Îşay de mêrasa me nîne;
ya Îsraêl, bila her kes vegerin ça-
dirên xwe! Ya Dawid, niha li mala
xwe binêre! Û hemûya Îsraêlê
çûn çadirên xwe. 17 Û Rehoboam
tenê li ser lawên Îsraêl, yên ku li
bajarên Cihûda ve rûdinin, qira-
letiyê kir. 18 Û qiral Rehoboam,
Hadoramê ku li ser suxrevanayî
şand û lawên Îsraêl wî dan ber
keviran û mir. Û qiral Rehoboam,
bona ku bireve Orşelîmê hema li
erebeya xwe yî cengê siwar bû.
19 Û Îsraêl heta îrojê li dijî mala
Dawid ve asê bûn.

*Rehoboam Cihûda xwurttir dike*

1.Qir 12,21-24

11 Û Rehoboam hate Orşe-
lîmê û malên Cihûda û
Benyamîn, sed û heyştê hezar
zilamên cengê, ên bijartî, bona
ku li dijî Îsraêlê cengê bikin û
qiraletiyê bi aliyê Rehoboam ve
bizivirînin dan hev. 2 Lê belê ji
zilamê Xwedê Şemaya re vê go-
tina XUDAN hat: 3 Bi lawê Silê-
man, qiralê Cihûda Rehoboam re
û ji hemûya Îsraêla ku li Cihûda
û Benyamîn re biaxife û bibêje:
4 XUDAN wusa dibêje: Hûn ê
dernekevin û hûn ê li dijî birayên
xwe cengê nekin; vegerin, bila her
kes vegere mala xwe! Ji ber ku ev
tişt ji min bû. Û gotina XUDAN
guhdarî kirin û ji çûyîna li dijî Ye-
roboamê vegeriyan.
5 Û Rehoboam li Orşelîmê rûnişt
û li Cihûdayê bona xwe paras-
tinê bajaran ava kir. 6 Bajarên bi
dîwar ên li Cihûda û Benyamînê
ne, Beytlehemê û Eytamê û Te-
koayê 7 û Beyt-Tsûrê û Sokoyê
û Adûllamê 8 û Gatê û Mareşayê
û Zîfê 9 û Adoraîmê û Lakîşê û
Azekayê 10 û Sorayê û Ayyalonê
û Hebronê ava kir. 11 Û bircan
zeximand û serokan, tedarîka ze-
wêde û rûn û xemrê danî wan de-
ran. 12 Û mertal û rimên mezin ji
her bajarî re danî û wan bi zêdeyî
zeximand. Û Cihûda û Benyamîn
yên wî bûn.
13 Û kahîn û Lêwiyiyên ku li
hemûya Îsraêlê ne, ji sînorên wan
ve li cem Rehoboam civiyan.
14 Ji ber ku Lêwiyiyan çêregeh û
milkên xwe berdan û hatin Cihû-
dayê û Orşelîmê; ji ber, bona ku
ji XUDAN re kahîntiyê nekin,
Yeroboam û lawên wî wan avêtin
15 û bona cîhên bilind û bona nêri-

yan û bona golikên ku çêkirine, ji
xwe re kahînan danîn. 16 Û ji hemû
nîjadên Îsraêlê, ên ku dilên xwe bi
gerîna Xwedayê Îsraêlê XUDAN
ve girêdane, bona ku ji Xwedayê
bapîrên xwe, ji XUDAN re qurban
bikin, li pêy wan hatin Orşelîmê.
17 Û qiraletiya Cihûda xwurt kirin
û sê sal, Rehoboamê lawê Silêman
xwurt kirin; ji ber ku sê sal di rêya
Dawid û Silêman de meşiyan.
18 Û Rehoboam, Mahalata qîza
Abîhaîla qîza Elîabê lawê Yêsseyî
û qîza Yerîmotê lawê Dawid e, ji
xwe re bi jinitî girt 19 û jê re lawan
anî dinê; Yeûş û Şemarya û Zaham.
20 Û paşî Mahalatê Maakaya qîza
Abşalom stend û jê re Abiya û Atta
û Zîza û Şelomît anî dinê. 21 Û Re-
hoboam, ji hemû jin û cariyên xwe
zêdetir ji Maakaya qîza Abşalom
ve hez kir; ji ber ku hîjdeh jin û
şêst cariye stendin; ji bîst û heyşt
law û şêst qîzî re bû bav. 22 Û Re-
hoboam, Abiyayê lawê Maaka, ji
nav birayên wî, bi serwerî anî serî,
ji ber ku bona wî bike qiral difikirî.
23 Û baqilî kir û li welatên hemû
Cihûda û Benyamînê ji her bajarên
bi dîwar ve li lawên xwe belav kir
û bi zêdeyî zewêde da wan. Û bona
wan li zehf jinan geriya.

*Şîşak êrîşî Orşelîmê dike*
1.Qir 14,21-31

12 Û wusa bû ku, dema qira-
letiya wî zeximî û ew bi
xwe xwurt bû, Rehoboam û tevî
wî hemûya Îsraêlê, dev ji zagona
XUDAN berdan. 2 Û wusa bû, ji
ber ku li dijî XUDAN xayîntiyê
kirin, Şîşakê qiralê Misirê tevî
hezar û du sed erebeyên cengê
û şêst hezar siwarî, di pênc sali-
ya qiral Rehoboam de hilkişiya
Orşelîmê. 3 Û netewa ku tevî wî
ji Misirê ve hatin, Lûbiyan, Sûk-
kiyan û Hebeşan, nedihatin ji-
martinê. 4 Û bajarên bi dîwar ên
Cihûda girtin û hat Orşelîmê. 5 Û
peyxamber Şemaya ji Rehobo-
am re û ji serokên Cihûda ên ku
ji ber Şîşak li Orşelîmê civiyane
re hat û ji wan re got: XUDAN
wusa dibêje: We min berdan, ji
ber vêya ye ku min jî we bi des-
tê Şîşak ve berda. 6 Û serokên
Îsraêlê û qiral xwe nizm kirin
û: XUDAN bi dadî ye! gotin.
7 Û dema XUDAN dît ku xwe
nizm kirin, vê gotina XUDAN ji
Şemaya re hat: Xwe nizm kirin;
ez ê wan helaq nekim; lê belê ez
ê hinekî xelasiyê bidim wan û dê
hêrsa min bi destê Şîşak ve li ser
Orşelîmê neyê rijandin. 8 Lê belê
bona ku xizmeta min û xizmeta
qiralên welatan fêhm bikin, dê
bibin koleyên wî.
9 Û Şîşakê qiralê Misirê li dijî
Orşelîmê derket û xezîneyên mala
XUDAN û xezîneyên mala qiral
rahişt û bir; her tiştî rahişt û bir;
mertalên zêrîn ên ku Silêman wan

çêkiribûn jî rahişt û bir. 10 Û qi-
ral Rehoboam li dêvila wan mer-
talên tûnc çêkir û da destê serokên
leşkerên parêzker ên ku li benda
deriyê mala qiral in. 11 Û wusa bû
ku, qiral her ku diket mala XU-
DAN, parêzkeran dihatin û wan
dikişandin û wan şunda dianîn
odeya parêzkeran. 12 Û dema
xwe nizm kir, bona ku wî bitûmî
helaq neke, hêrsa XUDAN ji ser
wî vegeriya; him jî di Cihûda de
karên qenc jî hebûn.
13 Û qiral Rehoboam xwe li
Orşelîmê zeximand û qiraletiyê
kir; ji ber ku dema Rehoboam bû
qiral, çel û yek salî bû û bona ku
navê xwe deyne wir û li bajarê ku
XUDAN ji hemû nîjadên Îsraêlê
ve hilbijartiye, li Orşelîmê, hivdeh
sal qiraletiyê kir û navê dayika wî
Naamaya Ammonî bû. 14 Û tiştê
ku xerab e kir û ji ber ku li gerîna
XUDAN ve dil girê neda.
15 Û karên ku Rehoboam kiriye,
karên wî yên pêşîn jî karên wî yên
paşîn jî, ma di gotinên peyxamber
Şemaya û Îddoyê ku Dibîne de, li
gor dora regezê ne nivîsandîne? Û
di navbera Rehoboam û Yerobo-
am de di hemû rojan de ceng hebû.
16 Û Rehoboam tevî bapîrên xwe
raket û li bajarê Dawid hate binax
kirin û li dêvila wî, lawê wî Abiya
bû qiral.

*Qiraletiya Abiya ya Cihûdayê*

1.Qir 15,1-8

13 Di hîjdeh saliya qiral Yero-
boam de Abiya li ser Cihûda
ve bû qiral. 2 Li Orşelîmê sê sal
qiraletiyê kir û diya wî qîza Ûrîêlê
Gîbeayî bû û navê wê Mîkaya bû.
Û di navbera Abiya û Yeroboam
de ceng hebû. 3 Û Abiya bi artêşek
ji zilamên egîd ên cengêyî, tevî çar
sed hezar zilamên bijartî ve dest bi
cengê kir û Yeroboam tevî heyşt
sed hezar zilamên bijartî, bi zi-
lamên dilawêr ve, li dijî wî, bona
cengê rêzê girêdan. 4 Û Abiya li
çiyayê Tsemaraîma ku li çiyayiya
Efrayîmê ye, bi peyatî sekinî û got:
Ya Yeròboam û hemûya Îsraêlê,
min guhdarî bikin! 5 Ma hûn pê
nizanin ku, Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN, bi peymana abadîn[1] qiraleti-
ya li ser Îsraêlê daye Dawid, daye
wî û lawên wî? 6 Lê belê koleyê
Silêmanê lawê Dawid, Yeroboamê
lawê Nebat rabû û li dijî efendiyê
xwe rabû. 7 Û zilamên vala û bikêr
nayî, li cem wî civiyan û ji ber ku
Rehoboam ciwan bû û dilnerm bû
û hêz neanî ku li ber wan bisekine,
li dijî Rehoboamê lawê Silêman
ve xwurt bûn. 8 Û niha hûn li dijî
qiraletiya XUDAN ya ku di destê
lawên Dawid de yî sekinê difikirin
û hûn ajaweyek mezin in, golikên
zêrîn, ên ku Yeroboam wan bi
îlahtî ji we re çêkiriye jî di nav we
de ne! 9 Ma we kahînên XUDAN,

---

1 Di zimanê Îbranî de: Peymana xwê.

lawên Harûn û Lêwiyiyan neqe-
wirandin û wekî ûsila neteweyên
welatên din ji xwe re kahînan çê-
nekirin? Her kî bi ganêrekî ciwan
û heft beranî, bona ku xwe tirxan
bike were, ew zilam ji yên ku ne
îlah in re dikare bibe kahîn. 10 Lê
belê em jî, Xwedayê me XUDAN
e û me dew ji wî bernedan û di me
de di xizmeta XUDAN de kahîn-
an, lawên Harûn û di ser karên xwe
de Lêwiyî hene 11 û her sibeh û
her êvar ji XUDAN re pêşkêşiyên
şewitandinê û buxurên bêhn xweş
vêdixin[1] û di me de li ser sifra
paqij nanê aramiyê û bona ku her
êvarê vêxin şimadanka zêrîn û
qendîlên wê hene; ji ber ku em no-
tirvaniya Xwedayê xwe XUDAN
dikin, lê belê we dev ji wî berdan!
12 Û a vay, wekî Xwedê di serî
de, kahînên wî jî bi me re ne; bona
ku li dijî we lêbixin di destên wan
de boriyên dengê bilind didin
hene. Ya lawên Îsraêl, li dijî Xwe-
dayê bapîrên xwe XUDAN ve
cengê mekin; ji ber ku dê karê we
qenc neçe!
13 Û Yeroboam dor li paşiya wan
ve zîvirand û dafikê avêt; wusa
ku, ew li ber Cihûda bû; lê belê
dafik li paşî wan bû. 14 Û gava
Cihûda li paşî xwe nihêrt, a vay,
li pêşiya wan û li paşiya wan
ceng hebû; ji XUDAN re qêriyan
û kahînan li boriyan xistin. 15 Û
zilamên Cihûda qêriyan û dema
zilamên Cihûda qêriyan, wusa bû
ku, Xwedê li ber Abiya û Cihû-
da li Yeroboam û hemûya Îsraêlê
ve xist. 16 Û lawên Îsraêl ji ber
Cihûda reviyan û Xwedê wan dan
destê vana. 17 Û Abiya û netewa
wî, bi lêxistina mezin li wan xist;
wusa ku, ji Îsraêlê bi mirîtî pênc
sed hezar zilamên bijartî ketin.
18 Bi vî awayî lawên Îsraêl, di
wê demê de hatin binketî kirin û
lawên Cihûda bi ser ve ketin, ji ber
ku xwe spartin Xwedayê bapîrên
xwe XUDAN. 19 Û Abiya bera
pêy Yeroboam da û ji wî bajaran
stendin, Beytelê û navçeyên wê û
Yeşanayê û navçeyên wê û Efronê
û navçeyên wê stendin. 20 Û di
rojên Abiya de Yeroboam carekî
din xwurt nebû û XUDAN lê xist
û mir. 21 Lê belê Abiya her ku çû
xwurt bû û çardeh jinî ji xwe re
stend û bû bavê bîst û du law û
şanzdeh qîzî. 22 Û karên ku Abi-
ya kiriye ên li pêy mane û rêyên
wî û gotinên wî, di şiroveya pey-
xamber Îddo de nivîsandîne.

*Qiraletiya Asa ya Cihûdayê*

1.Qir 15,11-12

14 Û Abiya tevî bapîrên xwe
raket û li bajarê Dawid wî
binax kirin û li dêvila wî, lawê wî
Asa bû qiral. Di rojên wî de welat
deh sal rehet kir. 2 Û Asa, ya ku

[1] Dişewitînin.

di çavê Xwedayê xwe XUDAN
de qenc û rast e kir; 3 ji ber ku
pêşkêşiyên biyan û cîhên bilind
rakir û kevirên çikandî şikand û
Aşeran jêkir 4 û lêgerîna Xwe-
dayê bapîrên xwe XUDAN û ki-
rina zagon û emir ji Cihûdan re
got. 5 Û ji hemû bajarên Cihûda
ve cîhên bilind û pûtên rojê rakir
û welat li ber çavê wî ve rehet kir.
6 Û li Cihûdayê bajarên bi dîwar
ava kir; ji ber ku welat rehet bû
û di wan salan de cenga wî tu-
nebû, ji ber ku XUDAN rehetiyê
dabû wî. 7 Û ji Cihûda re got: Em
van bajaran ava bikin û dîwar û
qûle, derî û zendan li dorên wan
çêbikin; hîn welat li ber me ye, ji
ber ku em li Xwedayê xwe XU-
DAN geriyan; em lê geriyan û bi
dor û ber aramiyê da me. Û çê-
kirin û karên wan qenc çû. 8 Û
artêşa Asa hebû; ji Cihûdayê sê
sed hezar kesên ku rim û mertalên
mezin rahiştine û ji Benyamîn ve
du sed û heyştê hezar kesên ku
mertala biçûk dikişînin û kevanê
dişidînin; hemûyên vana egîdên
dilawêr[1] bûn.
9 Û li dijî vana Zerahê Hebeşî
bi hezar hezaran leşkeran û bi sê
sed erebeyên cengê ve derket û
hate Mareşayê. 10 Û Asa li dijî
wî derket û li Mareşayê, di çemê
Tsefatayê de bona cengê rêz bûn.
11 Û Asa bangî Xwedayê xwe
XUDAN kir û got: Ya XUDAN!
yê ku di navbera xwurt û bêhêz
de alîkariyê bike, xeynî te nîne;
ya XUDAN Xwedayê me, alîka-
riyê bi me re bike! ji ber ku me
xwe sipartine te û em bi navê te li
dijî vê ajaweyê derketin. Ya XU-
DAN, Xwedayê me tu yî; bila mi-
rov li hemberî te bi ser ve nekeve!
12 Û li ber Asa û li ber Cihûda XU-
DAN li Hebeşiyan xist û Hebeşî
reviyan. 13 Û Asa û netewa ku
tevî wî bûn heta Gerarê bera pêy
wan dan û ji Hebeşiyan ewqasî
kes ketin ku, di wan de jiyan tune
bû; ji ber ku li ber XUDAN û li
ber artêşa wî şikestiya bûn û gel-
lekî malê talanê kişandin. 14 Û li
hemû bajarên ku li dora Gerarê
ne xistin; ji ber ku li ser wan tirsa
XUDAN hebû û hemû bajaran
talan kirin; ji ber ku di nav wan
de gellek malên ku werin talan ki-
rin hebûn. 15 Li çadirên şivanan
jî xistin û gellekî mîh û deveyan
ajotin û vegeriyan Orşelîmê.

*Gotina Peyxamber Azarya û xîreta Asa ya ji bona Xudan*

1.Qir 15,9-15

15 Û Ruhê Xwedê bi ser Azar-
yayê lawê Oded ve hat 2 û
derket ber Asa û jê re got: Ya Asa
û hemûya Cihûda û Benyamîn,
min guhdarî bikin! Her ku hûn bi
XUDAN re bin, ew jî bi we re be

1 Wêrek, an jî: Cesûr.

û ger hûn li wî bigerin, ew xwe bi
we re dide dîtin; lê belê ger hûn
dev ji wî berdin, ew jî dev ji we
berdide. 3 Û ji demekê dirêj ve
Xwedayê Îsraêlê yê rast tunebû û
kahînê wanî fêrmend tunebû û za-
gona wan tunebû; 4 lê belê dema
di tengasiya xwe de berê xwe da
Xwedayê Îsraêlê XUDAN û lê
geriya, xwe bi wan ve da dîtin.
5 Û di wê demê de bona yê ku
derdikeve û yê ku dikeve xweşî
tunebû; lê belê li ser hemûyên ku
di welatan de rûdinin şaşiyên me-
zin hebûn. 6 Û netewe bi netewê
re û bajar bi bajarê ve li hev û din
dixistin; ji ber ku Xwedê bi her
tewrî tengasiyê ve wan şaş û me-
tal dikir. 7 Lê belê hûn xwurt bin
û bila destên we sist nebin, ji ber
ku berdêla karên we hene!
8 Û dema Asa, van gotinan û
peyxambertiya peyxamber Oded
bihîst quwetê dît û ji bajarên ku,
ji warê hemûya Cihûda û Ben-
yamîn û ji çiyayiya Efrayîm ve
stendiye tiştên mekrûh rahişt û
avêt û pêşkêşiya XUDAN, ya ku
li ber eywana XUDAN e nû kir.
9 Û hemûya Cihûda û Benyamînê
û ji nav wan ên ku ji Efrayîmê
û ji Manaşşeyê û ji Şîmeûnê ve
mêvan in civand; ji ber, dema ku
dîtin Xwedayê wî XUDAN pê re
ye, ji Îsraêlê gellekî mêvanan li
serê wî kom bûn. 10 Û di panzdeh
saliya qiraletiya Asa de, di meha
sêwemîn de, li Orşelîmê civi-
yan. 11 Û ew roj, ji malên talanê
ên ku anîne heft sed ganêr û heft
hezar mîh ji XUDAN re qurban
kirin. 12 Û bona ku bi hemûya
dilê xwe û bi hemûya canên xwe
li Xwedayê bapîrên xwe XU-
DAN bigerin peymanê danîn 13 û
dixwaze bila biçûk be, dixwaze
bila mezin be, dixwaze bila mêr
be, dixwaze jin her kesê ku li Xwe-
dayê Îsraêlê XUDAN ve negere,
dê bihata kuştin. 14 Û li borî û zir-
neyan xistin û bi qêrîn û bi dengê
bilind ji XUDAN re sondê dan.
15 Û li ser vê peymanê hemûya
Cihûda kêfxweş bûn; ji ber ku bi
hemûya dilên xwe ve sondê dabûn
û bi hemûya xwestina xwe li XU-
DAN geriyan û wî xwe bi wan re
da dîtin û XUDAN bi dorûberê ve
aramiyê[1] da wan.
16 Û Maakaya dayika qiral Asa
jî ji qiralîçetiyê rakir, ji ber bona
Aşera pûtekî mekrûh çêkiribû û
Asa pûtê wê jêkir û kir toz û di
newala Kîdronê de wê şewitand.
17 Lê belê ji Îsraêlê ve cîhên bi-
lind nehatin rakirin; lê dilê Asa
her tim yek bû. 18 Û tiştên ku
bavê wî pîroz kiribû û tiştên ku
wî bi xwe pîroz kiribû, zîv û zêrê
û feraxan anî mala Xwedê. 19 Û
heta sîh û pênc saliya qiraletiya
Asa ceng nebû.

1 Rehetiyê.

*Salên Asa yên dawîn*

1.Qir 15,16-24

16 Û di sîh û şeş saliya qiraletiya Asa de, qiralê Îsraêlê Baaşa, li dijî Cihûda derket û bona nehêle ku zilam herin cem qiralê Cihûdayê Asa û ji cem wî dernekevin, bajarê Ramayê ava kir. 2 Û Asa ji xezîneyên mala XUDAN û mala qiral ve zîv û zêr derxist. Û ji qiralê Sûriyê Ben-Hadadê ku li Şamê rûdine re şandin û got: 3 Mîna ku di navbera bavê min û bavê te de hebû, di nava min û te de jî peyman heye; a vay, zîv û zêr ji te re şandim, here, peymana xwe yî bi qiralê Îsraêlê Baaşa re yî xera bike ku bila ji ser min vegere! 4 Û Ben-Hadad qiral Asa guhdarî kir û serokên artêşên xwe li dijî bajarên Îsraêlê şand û li Iyonê û Danê û Abel-Mayîmê û li hemû bajarên embarê ên Naftaliyê xistin. 5 Û wusa bû ku, dema Baaşa vê yekê bihîst, dev ji avakirina Ramayê berda û dev ji karê xwe berda. 6 Û qiral Asa hemûya Cihûdayê girt cem xwe û kevir û oniyên Ramaya ku Baaşa wê ava dikir kişandin û bi wan ve Geba û Mîtspayê ava kir.

7 Û di wê demê de Hananiyê ku Dibîne, hate cem Asayê qiralê Cihûda û jê re got: Madem ku te xwe sipart qiralê Sûriyê û te xwe nesipart Xwedayê xwe XUDAN, ji ber vê yekê artêşa qiralê Sûriyê ji destê te ve reviya û xelas bû. 8 Hebeşiyan û Lûbiyan, bi gellekî hespan û bi erebeyên cengê ma ne artêşekî mezin bûn? Û ji ber ku te xwe sipartibû XUDAN, wan da destên te. 9 Ji ber ku çavên XUDAN, bona ku di oxra yên ku dilên wan bi wî re yek in de xwurtbûna xwe nîşan bide, li hemûya rûyê erdê ve fir dibe. Te di vî karî de bêaqiltiyê kir; ji ber ku dê ji niha pê ve bi te re ceng bêne kirin!

10 Û Asa ji yê ku Dibîne ve hêrs bû û wî avêt girtîgehê; ji ber ku ji ber vê yekê ji wî hêrs dibû. Û di wê demê de Asa, ji netewê hin kesan eciqand. 11 Û a vay, karên Asa, karên pêşîn jî yên paşîn jî, a vay, ew di pirtûka qiralên Cihûda û Îsraêlê de nivîsandîne. 12 Û sîh û neh saliya qiraletiya xwe de, Asa ji lingên xwe ve nexweş ket; nexweşiya wî di dereca zêde de giran bû; him jî di nexweşiya xwe de ne li XUDAN, lê li hekîman geriya.

13 Û çel û yek saliya qiraletiya xwe de Asa mir û tevî bapîrên xwe raket. 14 Û wî di gora ku li bajarê Dawid de, bona wî kolane binax kirin û wî di livînekî bi bêhnên xweş û bi tewr û tewr biharatan li gor karên etaran hatiye amadekirin tijî kirî de dirêj kirin û bona wî agirekî gellekî mezin vêxistin.

### *Qiraletiya Yehoşafat ya Cihûdayê*

1.Qir 22,41-47

17 Û li dêvila wî, lawê wî
Yehoşafat bû qiral û li
hemberî Îsraêlê xwe zeximand.
2 Û cengewaran danî hemû ba-
jarên bi dîwar ên Cihûdayê û
leşkeran danî warê Cihûdayê û
bajarên Efrayîmê ên ku bavê wî
Asa wan stendiye. 3 Û XUDAN
bi Yehoşafat re bû, ji ber ku di
rêyên pêşîn ên bapîrê xwe Dawid
de meşiya û li Baalan negeriya,
4 lê belê li Xwedayê bavê xwe
geriya û ne li gor karên Îsraêl, di
emirên Xwedê de meşiya. 5 Û
XUDAN qiraletiyê di destê wî
de zeximand û hemûya Cihûda
xelatan ji Yehoşafat re anîn û pirr
serweta wî û mezintiya wî hebû.
6 Û di rêyên XUDAN de wêrek
bû û cîhên bilind û Aşeran jî ji
Cihûdayê rakir.
7 Û di sê saliya qiraletiya xwe
de, bona ku di bajarên Cihûda de
hînî gel bikin, serokan, Ben-Hayîl
û Obadya û Zekarya û Netanel û
Mîkaya 8 û tevî wan Lêwiyiyan,
Şemaya û Netanya û Zebadya û
Asahel û Şemîramot û Yehonatan
û Adoniya û Tobiya û Tobadoni-
ya, Lêwiyiyan û tevî wan kahîn-
an, Elîşama û Yehoram şand. 9 Û
li Cihûdayê hînî gel kirin û li cem
wan pirtûka zagonê ya XUDAN
hebû û li hemû bajarên Cihûdayê
geriyan û hînî netewê kirin.
10 Û tirsa XUDAN ket ser hemû
qiraletiyên welatan ên ku li dora
Cihûdayê ne û li dijî Yehoşafat
cengê nekirin. 11 Û hinek ji Filis-
tiyan xelatan û wekî xeracê zîv ji
Yehoşafat re anîn; Ereban jî ji wî
re keriyan, heft hezar û heft sed
heb beran û heft hezar û heft sed
nêrî anîn. 12 Û Yehoşafat her ku
çû bihêz bû[1] û li Cihûdayê bircan
û bajarên embarê çêkir. 13 Û di
bajarê Cihûdayê de pirr karên wî û
li Orşelîmê zilamên wî yên cengê,
egîdên wî yên dilawêr hebûn. 14 Û
li gor hejmara malên bapîrên wan
ev bûn: Ji Cihûdayê, serê hezaran:
Serok Adna û tevî wî sê sed hezar
egîdên dilawêr 15 û li cem wî se-
rok Yehohanan û tevî wî du sed û
heyştê hezar 16 û li cem wî, Amas-
yayê lawê Zîkrî ê ku bi dil xwe ji
XUDAN re tirxan kiriye û tevî wî
du sed hezar egîdên dilawêr. 17 Û
ji Benyamînê, Elyadayê ku egîdek
dilawêr bû û tevî wî du sed hezar
kesên ku bi kevan û mertalê ha-
tine çekdarî kirin 18 û li cem wî
Yehozabad û tevî wî sed û heyştê
hezar kesên ku bona cengê hatine
arastin. 19 Xeynî leşkerên ku qiral
li hemûya Cihûdayê, wan danîne
bajarên bi dîwar, ên ku xizmetê ji
qiral re dikirin vana bûn.

[1] An jî: Û Yehoşafat her ku çû heta ku bigihê dereca zehf zêdeyî mezin bû.

*Peyxamber Mîkaya Ahab îkaz dike*
1.Qir 22,1-14

18 Û zehf serwet û mezintiya Yehoşafat hebû û bû merivê Ahab. 2 Û paşî çend salî daket Samîriyê, cem Ahab. Û Ahab bona wî û bona netewa ku bi wî re ne, pirr mîh û ga serjê kir û bona ku pev re hilkişin Ramot-Gîleadê wî xapand. 3 Û qiralê Îsraêlê Ahab, ji qiralê Cihûdayê Yehoşafat re got: Gelo tuyê bi min re here Ramot-Gîleadê? Û wî got: Min mîna xwe bihesibîne û netewa min, mîna netewa xwe bihesibîne û em ê di cengê de bi te re bin.

4 Û Yehoşafat ji qiralê Îsraêlê re got: Ez rica dikim, pêşiyê gotina XUDAN bipirse! 5 Û qiralê Îsraêlê peyxamberan, çar sed kesî civand û ji wan re got: Gelo em herin Ramot-Gîleadê cengê, ya na ez dev jê berdim? Û gotin: Hilkişe û dê Xwedê wê bide destê qiral! 6 Lê belê Yehoşafat got: Ma xeynî vana li vir peyxamberekî XUDAN nîne ku em ji wî bipirsin? 7 Û qiralê Îsraêlê ji Yehoşafat re got: Yekî din heye, em dikarin bi navdariya wî ji XUDAN ve bipirsin; lê belê ez ji wî dikerihim; ji ber ku di derheqê min de tu carî qenciyê nabêje, tim agahiya xerabiyê dide; ew Mîkayê lawê Îmla ye. Û Yehoşafat: Bila qiral wusa nebêje! got. 8 Û qiralê Îsraêlê bangî karmendekî kir û got: Lez bike, Mîkayê lawê Îmla bîne! 9 Û qiralê Îsraêlê û Yehoşafatê qiralê Cihûda, her yek li ser textên xwe, kincên qiral li xwe kirî rûniştin û di qada cîhê ketina deriyê Samîriyê de yî rûniştî bûn û hemû peyxamberan li ber wan peyxambertiyê dikirin. 10 Û Tsedekiyayê lawê Kenaana ji xwe re qiloçên hesin çêkir û got: XUDAN wusa dibêje: Heta ku Sûriyî biqedin, tuyê bi van qiloçan li wan bixî! 11 Û hemû peyxamberan bi vî awayî peyxambertiyê kirin û gotin: Hilkişe Ramot-Gîleadê û dê karê te qenc derbas bibe; ji ber ku dê XUDAN wê bide destê qiral!

12 Û şandiyê bona ku bangî Mîkaya bike çû bû pê re axifî û got: A vay, peyxamberan ji qiral re bi devekî qenciyê dibêjin; ez rica dikim ku bila gotina te jî mîna gotina yekî ji wan be û qenciyê bibêje. 13 Û Mîkaya got: Bona mafê XUDANê ku zindî ye, Xwedayê min çi ji min re bibêje, ez ê wê bibêjim! 14 Û hate cem qiral û qiral jê re got: Mîkaya, gelo em bona cengê herin Ramot-Gîleadê, an jî ez dev jê berdim? Û jê re got: Hilkişin û dê karên we qenc derbas bibin û dê wan bide destên we! 15 Û qiral jê re got: Ka ez çend carên din bi te re bidim sond dayînê ku tuyê bi navê XUDAN, xeynî rastiyê tu tiştî nebêjî? 16 Û

wî got: Min hemûya Îsraêlê, mîna
mîhên li serê çiyan e û şivanê wan
nîne dît û XUDAN got: Efendiyê
vana nîne; bila her kes bi xweşiyê
vegerin malên xwe! 17 Û qiralê
Îsraêlê ji Yehoşafat re got: Ma
min ji te re negot, di derheqê min
de ne qenciyê, lê dê xerabiyê bi-
bêje? 18 Û Mîkaya got: Wê gavê
gotina XUDAN guhdarî bikin:
Min XUDAN li ser texta xwe
rûniştî û hemûya artêşa ezmanan
li aliyê wî yên rast û çepê sekin-
andî dît. 19 Û XUDAN got: Ma
bona hilkişe Ramot-Gîleadê û jê
bikeve, dê kî Ahab bixapîne? Û
hineka wusa, hineka jî wekî din
gotin. 20 Û ruhek derket û li ber
XUDAN sekinî û got: Ez ê wî
bixapînim! Û XUDAN jê re got:
Ka bi çi? 21 Û wî got: Ez ê derke-
vim û di devê hemû peyxamberan
de bibim ruhekî derewçîn. Û got:
Tuyê bixapînî û him jî bi ser wî
bikeve; derkeve û wusa bike. 22
Û niha, a vay, XUDAN ruhekî de-
rewçîn xistiye devên van peyxam-
berên te û XUDAN di derheqê te
de ya xerab e gotiye.
23 Û Tsedekiyayê lawê Kenaan
nêzîk hat û li gepa Mîkaya xist
û got: Ruhê XUDAN, bona ku
bi te re biaxife, ji kîjan rêyî ve ji
min derbasî te bû? 24 Û Mîkaya
got: A vay, tuyê di roja ku bona tu
xwe veşêre bikeve odeyekî hun-
dirîn bibîne. 25 Û qiralê Îsraêlê
got: Mîkaya bigirin û wî şunda ji
serokê bajêr Amon û lawê qiral
Yoaş re vegerînin 26 û bibêjin:
Qiral wusa dibêje: Viya bavêjin
girtîgehê û heta ku ez bi saxitî ve-
gerim nanê keserê bi wî re bidin
xwarin û ava keserê pê re bidin
vexwarin! 27 Û Mîkaya got: Ger
tu bi xweşiyê vegerî, XUDAN bi
navdîtiya min ve negotiye! Û got:
Ya netewno, hûn gişt bibihîzin!

*Mirina Ahab*

1.Qir 22,29-40

28 Û qiralê Îsraêlê û Yehoşafatê
qiralê Cihûdayê hilkişiyan Ra-
mot-Gîleadê. 29 Û qiralê Îsraêlê
ji Yehoşafat re got: Ez ê qiyafetê
xwe biguherim û bikevim cengê;
lê belê tu kincê xwe li xwe bike.
Û qiralê Îsraêlê kincê xwe guhert
û ket cengê. 30 Û qiralê Sûriyê ji
serokên erebeyên xwe re, bi go-
tina: Ne biçûk ne jî bi mezin, tenê
bi qiralê Îsraêlê re cengê bikin emir
kiribû. 31 Û wusa bû ku, dema
serokên erebeyan Yehoşafat dîtin,
gotin: Qiralê Îsraêlê ev e! Û bona
ku li dijî wî cengê bikin zivirîn wî
aliyî û Yehoşafat qêriya û XUDAN
alîkariyê bi wî re kir û Xwedê wan
ji wî çewt kir. 32 Û wusa bû ku,
dema serokên erebeyan dîtin ku ew
ne qiralê Îsraêlê ye, ji pêy wî ve-
geriyan. 33 Û zilamek, bêyî nîşan
stendinê kevanê kişand û ji cîhên
ku zirxên wî digihêjin hev, li qiralê

Îsraêlê xist û qiral ji erebevanê xwe
re got: Hefsarê bizivirîne û min ji
artêşê ve derxîne; ji ber ku ez bi
giranî birîndar bûm. 34 Û ceng wê
rojê zêde bû û qiralê Îsraêlê heta
êvarî li dijî Sûriyeyiyan, di erebeya
xwe yî cengê de, li ber xwe da û di
demên ku roj here ava de mir.

*Yehûyê ku dibîne, Yehoşafat diazirîne*

19 Û Yehoşafatê qiralê Cihû-
dayê, bi xweşiyê vegeriya
Orşelîmê, mala xwe. 2 Û lawê
Hananî, Yehûyê ku Dibîne der-
ket pêşiya wî û ji qiral Yehoşafat
re got: Bona te, gelo alîkariya bi
xeraban re û ji yên ku ji XUDAN
ve dikerihin hezkirin hewce dike?
Ji ber vê yekê li ser te, ji aliyê
XUDAN ve hêrs heye. 3 Lê tevî
vê yekê di te de tiştên qenc ha-
tin dîtin; ji ber ku te Aşereyan ji
welat ve rakir û avêt û dilê xwe,
bona lêgerîna Xwedê amade kir.
4 Û Yehoşafat li Orşelîmê ma û
dîsa ji Beer-Şebayê heta çiyayiya
Efrayîmê derket nav neteweyê û
wan vegerandin Xwedayê bapîrên
wan XUDAN. 5 Û li welêt, ji hemû
bajarên bi dîwar ên Cihûdayê, ba-
jar bi bajar serweran danîn 6 û ji
serweran re got: Ka li çi çêkirina
xwe binêrin; ji ber ku hûn ne bona
mirov, bona XUDAN serweriyê di-
kin û di karê daraziyê de ew bi we
re ye! 7 Û niha, bila di ser we de
tirsa XUDAN hebe; bala xwe bidin
û bikin; ji ber ku li cem Xwedayê
me XUDAN neheqî, an jî xatir he-
sibandin, an jî bertîl stendin nîne.
8 Û Yehoşafat, bona kirina dara-
ziyên XUDAN û bona dozan li
Orşelîmê jî ji Lêwiyiyan û ji kahîn-
an û ji serên malên bapîrên Îsraêlê
ve danîn. Û vegeriyan Orşelîmê.
9 Û emir da wan û got: Bi vî awayî,
hûn ê bi tirsa XUDAN, bi dilsoziyê
û bi dilekî tûmî bikin. 10 Û di her
doza birayên we ên ku di bajarên wî
de rûdinin de, ên ku ji we re werin,
dixwaze bila di nava xwîn û xwînê
de be, dixwaze jî bila di nava şerîet
û emir û zagon û daraziyan de be,
wan biparêzin ku bila li dijî XU-
DAN ne sûcdar bin û bila bi ser we
û bi ser birayên we ve hêrs neyê;
wusa bikin û hûn ê bi sûc nebin!
11 Û a vay, bona her karê XUDAN,
Amaryayê serokkahîn û bona her
karê qiral, Zebadyayê lawê Îs-
maîlê serwerê mala Cihûdayê li ser
we ne û dê Lêwiyî li ber we bibin
karmend. Xwurt bin û bikin û bila
XUDAN bi zilamê qenc re be!

*Şerê ku li dijî Moab û Ammoniyan*

20 Û paşî vêya wusa bû ku,
lawên Moab û lawên
Ammon û tevî wan, hinekên ji
Ammoniyan in[1], bona ku li dijî

1 Dibe ku Menûniyan bin; li birra bîstan ayeta heftemîn binêre.

Yehoşafat cengê bikin, hatin.
2 Û zilaman hatin û ji Yehoşafat
re gîhandin û gotin: Ji behrê wê-
detir, ji Sûriyê, li dijî te ajaweyek
mezin tê û a vay, ew li Hatsatson-
Tamarê ne, ew En-Gedî ye! 3 Û
Yehoşafat tirsiya û dest bi lêgerî-
na XUDAN kir û li hemûya Cihû-
dayê banga sê roj rojî girtinê kir.
4 Û Cihûda bona ku ji XUDAN
ve alîkariyê bixwazin civiyan; ji
hemû bajarên Cihûdayê jî bona
lêgerîna XUDAN hatin.
5 Û Yehoşafat li mala XUDAN, li
ber hewşa nû, di nava civaka Cihû-
dayê û Orşelîmê de sekinî 6 û got:
Ya XUDAN, Xwedayê bapîrên me,
ma yê ku li ezmanan Xwedê ye, ne
tu yî? Û yê ku li ser hemû qiraleti-
yên neteweyan serwer e ne tu yî? Û
qudret û zordarî di destên te de ne û
tu kes nikare li hemberî te bisekine.
7 Ya Xwedayê me, ma yê ku kesên
li vî welatî rûdinin ji ber netewa te
Îsraêlê qewirandine û wê bi abadînî
dayiye nîjada dostê te Birahîm ne
tu yî? 8 Û li wir rûniştin û bona te,
li wir ji navê te re perestgehek çê-
kirin û gotin: 9 Ger asîw, şûr, qeza,
weba an jî xela bi ser me ve were,
li ber vê malê û li ber te bisekinin.
ji ber ku navê te di vî xaniyî de ye
û di tengasiya xwe de ji te re bi-
qêrin û tuyê bibihîze û xelas bike!
10 Û niha, a vay, dema ji Misirê ve
dihatin lawên Ammonê ku te nehişt
Îsraêl bikeve nava wan û ji cem
wan çewt bibin û bên helaq kirin û
Moabiyan û yên ku li çiyayê Seîrê
ne, 11 bi hatina ku me ji milka te yî
te bi mêrasî daye me biqewirînin,
a vay, bersiva te bi çi avayî didin
me. 12 Ya Xwedayê me, ma tuyê
daraziyê li wan nekî? Ji ber ku li
dijî vê ajaweya mezin ya bi ser me
ve tê, hêza me nîne û em nizanin
ku ka em ê çi bikin; lê çavên me
li ser te ne! 13 Û hemûya Cihûda,
tevî pitikan, pîrekan û lawên xwe li
ber XUDAN sekinandî bûn.
14 Û di nava civakê de, bi ser
Yahazîêlê Lêwiyî yê lawê Zekarya,
lawê Benaya, lawê Mattanya, lawê
Yeîelê ku ji lawên Asaf e, Ruhê
XUDAN hat 15 û got: Hemûya
Cihûdayê û yên ku li Orşelîmê rû-
dinin û tu, qiral Yehoşafat, baş guh-
darî bikin! XUDAN ji we re wusa
dibêje: Ji ber vê ajaweya mezin
metirsin û nekevin bêzariyê; ji ber
ku ceng ne ya we, lê ya Xwedê ye!
16 Sibê dakevin hemberî wan û a
vay, ew ji kaşa Tsîtsê hildikişin û
hûn ê di dawiya newalê de, li ber
çola Yerûêlê wan bibînin. 17 Ê ku
di vê şerê de cengê bike ne hûn
in; ya Cihûda û Orşelîm! Rêz girê
bidin û bisekinin, tevî xwe xela-
siya XUDAN bibînin; metirsin û
nekevin bêzariyê; sibê li dijî wan
derkevin; ji ber ku XUDAN bi we
re ye! 18 Û Yehoşafat bi ser rûyê
xwe ve xwe avêt erdê û hemûya
Cihûdayê yên ku li Orşelîmê rû-

dinin, bona ku peristinê ji XUDAN
re bikin li ber XUDAN secde kirin.
19 Û ji lawên Kohatiyan û ji lawên
Korahiyan Lêwiyiyan, bona ku bi
dengê bilind hemdê ji Xwedayê
Îsraêlê XUDAN re bikin rabûn
ser pêlan.
20 Û sibehê zû rabûn û derketin çola
Tekoayê û gava derketin Yehoşafat
sekinî û got: Ya Cihûda û yên ku
li Orşelîmê rûdinin, min guhdarî
bikin! Bi Xwedayê xwe XUDAN
bawer bikin û hûn ê di ewledariyê
de bin û bi peyxamberên wî ba-
wer bikin, dê karên we rast here!
21 Û paşî ku bi netewê re şêwirî,
yên ku qesîdeyan ji XUDAN re
dixwînin danîn, da ku, dema der-
kevin pêşiya artêşê bila bi xemlên
pîroz[1] ve şikiryê bikin û bibêjin:
Şikiryê ji XUDAN re bikin, ji ber
ku xêra wî abadîn e!
22 Û dema bi sitîranê dest bi
şikiryê kirin, XUDAN li dijî lawên
Ammon û Moabiyan û çiyayiyên
Seîrê ên ku dihatin Cihûdayê
kemînê danî û hatin lêxistin. 23 Ji
ber ku lawên Ammon û Moabiyan,
bona ku çiyayiyên Seîrê helaq
bikin û bitûmî tune bikin, li dijî
wan rabûn û gava gelê Seîrê
qedandin, bona ku xwe bi xwe
helaq bikin alîkariyê pev re kirin.
24 Û dema Cihûda gîhaştin qû-
leya notirvan ya çolê, li wê aja-
weyê nihêrtin û a vay, ew laşên
ku ketine erdê bûn û kesî ku bire-
ve û xelas bibe tunebû. 25 Dema
Yehoşafat û netewa wî, bona bi-
bezin malê talanê hatin, di nav
wan de pirr mal û laşan û tiştên
bi qîmet dîtin û wan, heta ku bona
xwe nikaribin bikişînin tazî kirin
û sê rojî di bezandina malê talanê
de bûn, ji ber ku pirr bû. 26 Û roja
çaremîn, di newala Beraka[2] de
civiyan; ji ber ku li wir XUDAN
pîroz kirin; ji ber vê yekê navê ne-
wala Beraka li wir kirin, heta îrojê
wusa ye.
27 Û hemû zilamên ji Cihûda û
ji Orşelîmê ne, wekî Yehoşafat
li serê 'wan be, bona ku bi
kêfxweşiyê vegerin Orşelîmê
şunda hatin; ji ber ku XUDAN li
ser neyarên wan, kêfxweşiyê dabû
wan. 28 Û bi santûran û bi çenkan
û bi boriyan hatin Orşelîmê,
mala XUDAN. 29 Û dema hemû
qiraletiyên welatan bihîstin ku
XUDAN li dijî neyarên Îsraêlê ve
cengê dike, tirsa Xwedê ket ser
wan. 30 Û welatê Yehoşafat gîhaşt
aramiyê; ji ber ku Xwedayê wî bi
dorûberê rehetiyê da wî.

*Dawiya Qiraletiya Yehoşafat*

1.Qir 22,41-51

31 Û Yehoşafat li ser Cihûdayê
qiraletiyê kir; dema bû qiral sîh

1 An jî: Bi xişran.

2 Berdarî, bereket.

û pênc salî bû û li Orşelîmê bîst
û pênc sal qiraletiyê kir. Û navê
dayika wî Azûbaya qîza Şîlhî
bû. 32 Û di rêya bavê xwe Asa
de meşiya û ya di çavê XUDAN
de rast e kir û jê şaş nebû. 33 Lê
belê cîhên bilind nehatin rakirin
û netewe hîn dilên xwe ji Xwe-
dayê bapîrên xwe re amade neki-
ribûn. 34 Û karên Yehoşafat ên li
pêy mane, karên wî yên pêşîn jî
yên paşîn jî, a vay, ew di dîroka
Yehûyê lawê Hananî ya ku der-
basî pirtûka qiralên Îsraêlê bûyî
de nivîsandîne.
35 Û paşî wê Yehoşafatê qiralê
Cihûdayê, bi Ahazyayê qiralê Îs-
raêlê ê ku di karê xwe de xerab
e li hev kirin[1]. 36 Û bona çûyîna
Tarşîşê, di çêkirina keştiyan de
bi wî re li hev kirin û li Etsyon-
Geberê keştiyan çêkirin. 37 Û
Eliezerê lawê Dodavahûnê ji
Mareşayê yî li dijî Yehoşafat pey-
xambertiyê kir û got: Ji ber ku
te bi Ahazya li hev kir, XUDAN
karên te xera kir! Û keştî perçe
perçe bûn û nikarîbûn ku biçin
Tarşîşê.

*Qiraletiya Yehoram ya Cihûdayê*
1.Qir 8,16-24

21 Û Yehoşafat tevî bapîrên
xwe raket û li bajarê Da-
wid li cem bapîrên xwe hate bin-
ax kirin û li dêvila wî, lawê wî
Yehoram bû qiral. 2 Û birayên wî,
lawên Yehoşafat hebûn; Azarya û
Yehîel û Zekarya û Azarya û Mî-
kael û Şefatya; vana giştî lawên
Yehoşafatê qiralê Îsraêlê bûn. 3
Û bavê wan, tevî bajarên bi dîwar
ên ji Cihûdayê, xelatên mezin ên
ji zîv û zêr û ji tiştên biqîmet in
da wan; lê belê qiraletiyê da Yeh-
oram, ji ber ku ew lawê yekemîn
bû. 4 Û gava Yehoram di şuna
bavê xwe de bû qiral û xurt bû,
hemû birayên xwe û hinekên ji se-
rokên Îsraêlê ne jî bi şûr ve kuşt.
5 Dema Yehoram bû qiral, sîh û
du salî bû û li Orşelîmê heyşt salî
qiraletiyê kir. 6 Û mîna ku mala
Ahab kiriye ew jî di rêya qiralên
Îsraêlê de meşiya; ji ber ku jina
wî, qîza Ahab bû û ya ku di çavê
XUDAN de xerab e kir. 7 Lê belê
ji ber peymana ku XUDAN bi Da-
wid re kiriye û ji ber wada ku dê di
hemû rojan de çirayekê bide wî û
lawên wî, kiribû, nexwest ku mala
Dawid helaq bike.
8 Di rojên wî de Edom serî hilda û
ji bin destê Cihûda derket û yekî li
ser xwe kirin qiral. 9 Û Yehoram
tev serokên xwe, hemû erebêyên
cengê li cem wan derbas bû û
şevê rabû û li Edomiyên ku dor lê
girtine û li serokên erebeyan xist.
10 Bi vî awayî Edom serî hilda,
heta îroj ji bin destê Cihûdayê
derketine; wê gavê Lîbna jî di

---
[1] Hemfikir bûn.

yek demê de serî hilda û ji bin
destê wî derketin, ji ber ku dev ji
Xwedayê bapîrên xwe XUDAN
berdabû.
11 Li çiyayên Cihûdayê jî cîhên bi-
lind çêkir û bi yên ku li Orşelîmê ve
rûdinin re zinê da kirin û Cihûdayê
jî ji rê derxist. 12 Û jê re, ji peyxam-
ber Êlyas ve ev nivîs hat: Xwedayê
bapîrê te Dawid, XUDAN wusa
dibêje: Madem ku tu di rêyên bavê
xwe Yehoşafat de û di rêyên Asayê
qiralê Cihûdayê de nemeşiya,
13 lê belê tu di rêya qiralên Îsraêlê
de meşiya û bi yên ku li Cihûdayê
û li Orşelîmê ve rûdinin re mîna ku
mala Ahab dike, zinê da kirin û ji
mala bavê xwe, birayên xwe yî ji te
qenctir in kuşt 14 û a vay, dê XU-
DAN bi lêxistinekî mezin li netewa
te û li lawên te û jinên te û li hemû
malên te bixe 15 û ji ber nexweşiyê,
heta ku roj bi rojê rêviyên te derke-
vin, tuyê bi nexweşiya rêviyê zehf
nexweş bikeve.
16 Û XUDAN li dijî Yehoram,
ruhê Filistiyan û Erebên ku li kêle-
ka Hebeşan e hişyar kir 17 û li dijî
Cihûdayê derketin û qelişandin û
ketin hundir û hemû malê ku di
mala qiral de yî, him jî lawên wî
û jinên wî birin û xeynî lawên wî
yê herî biçûk Yehoahaz[1], tu lawê
wî neman.
18 Û paşî ku vana hemûyan
çêbûn, XUDAN ji rêviyên wî,
bi nexweşiya ku baş nabe li wî
xist. 19 Û wusa bû ku, her ku
dem derbas bû paşî du salî ji ber
nexweşiya wî rêviyên wî derketin
û bi nexweşiyên xerab ve mir. Û
netewa wî mîna ku ji bapîrên wî
re tutsiyê vêxistin, bona wî vê-
nexistin. 20 Dema bû qiral sîh û
du salî bû û li Orşelîmê heyşt sal
qiraletiyê kir û ji koçkirina wî re
heyf bûyî nehat gotin û wî li ba-
jarê Dawid ve binax kirin, lê belê
li gorên qiralan de binax nekirin.

*Qiraletiya Ahazya ya Cihûdayê*

2.Qir 8,25-29; 9,16-29

22 Û yên ku li Orşelîmê rû-
dinin, li dêvila wî, lawê
wî yê herî biçûk Ahazya kirin
qiral; ji ber nijdeya ku bi Ereban
re hatiye artêşgehê hemû yên me-
zin kuştibûn. Û Ahazyayê lawê
Yehoramê qiralê Cihûdayê bû qi-
ral. 2 Ahazya, dema bû qiral çel
û du salî bû û li Orşelîmê salekî
qiraletiyê kir û navê dayika wî,
Atalyaya qîza Omrî bû. 3 Ew jî
di rêyên mala Ahab de meşiya; ji
ber, bona ku xerabiyê bike, dayi-
ka wî şîretan dida wî. 4 Û mîna
mala Ahab yê ku di çavê XU-
DAN de xerab e kir; ji ber ku bona
helaqbûna wî, paşî mirina bavê
wî, wana şîretan didan wî. 5 Bi
şîreta wan ve meşiya û tevî Yeh-
oramê qiralê Îsraêlê, ê lawê Ahab

1 Di birra bîst û duduyan, ayeta yekem de Ahazya.

re bona ku li Ramot-Gîleadê li dijî
qiralê Sûriyê Hazael cengê bike
çû û Sûriyiyan Yoram birîndar ki-
rin. 6 Û ji ber birînên ku dema li
Ramayê li dijî qiralê Sûriyê Ha-
zael cengê kiriye stendine, bona
ku baş bibe vegeriya Yîzrêelê. Û
Azaryayê[1] lawê Yehoramê qiralê
Cihûda, bona ku Yehoramê lawê
Ahab, ê ku li Yîzrêelê yî bibîne
daket, ji ber ku nexweş bû.
7 Û hatina Ahazya ya cem Yeho-
ram û helaq bûna wî ji Xwedê bû;
ji ber ku dema hat, li dijî Yehûyê
lawê Nîmşî ê ku bona mala Ahab
ji rehê wê jê bike XUDAN wî
mesh kiriye, tevî Yehoram der-
ket. 8 Û wusa bû ku, dema Yehû
li mala Ahab re daraziyê dianî
cîh, serokên Cihûdayê û biraziyên
Ahazya di xizmet kirina Ahazya
de dît û wan kuşt. 9 Û li Ahazya
geriya û gava ew li Samîriyê xwe
veşartî bû, bi wî girtin û ji Yehû re
anîn û wî kuştin û wî binax kirin,
ji ber ku gotin: Lawê Yehoşafatê
bi hemûya dilê xwe li XUDAN
geriyayî ye. Û di mala Ahazya de
hêza ku bi qiraletiyê bigire nema.

*Atalya dest dide ser Rêvebiriyê*
2.Qir 11,1-3

10 Û dema Atalyaya dayika
Ahazya, kuştina lawê xwe dît,
rabû û hemûya nîjada qiral ya
mala Cihûda tune kir. 11 Lê belê
qîza qiral Yehoşabeat, Yoaşê
lawê Ahazya girt û ji nava lawên
qiral ên ku hatine kuştin wî dizî
û wî û dadika wî xist odeya
livînan. Yehoşabeata pîreka kahîn
Yehoyada û qîza qiral Yehoram
e, – ji ber ku ew xwuşka Ahazya
bû –; bi vî awayî, bona ku wî
nekuje ji Atalyayê wî veşart. 12 Û
tevî wan şeş sal di mala Xwedê de
veşartî ma û Atalya li ser welêt ve
qiraletiyê kir.

*Serîhildana li dijî Atalyayê*
2.Qir 11,4-20

23 Û di sala heftemîn de
Yehoyada quwetê dît û bi
serokên sedan, Azaryayê lawê
Yehoram û Simayîlê lawê Yeho-
hanan û Azaryayê lawê Obêd
û Maaseyayê lawê Adaya û bi
Elîşafatê lawê Zîkrî ve peymanê
danî. 2 Û li Cihûdayê geriyan û
li hemû bajarên Cihûdayê Lêwi-
yiyan û serokên malên bapîrên
Îsraêlê dan hev û hatin Orşelîmê.
3 Û hemûya civakê li mala Xwe-
dê bi qiral re sondê dan. Û ji wan
re gotin: A vay, mîna ku XUDAN
di derheqê lawên Dawid de goti-
ye, dê lawê qiral, qiraletiyê bike.
4 Karê ku hûn ê bikin ev e: Ji
we ji kahîn û Lêwiyiyên ku roja
Sebtê dikevin, ji sisêyan yek dê
bibin dergevanên şêmûgê; 5 ji
sisêyan yek di mala qiral de bin

[1] Di ayeta yekemîn ya vê birrê de Ahazya.

û ji sisêyan yek dê di deriyê bin-
gehê de bin û dê hemûya netewê
di hewşên mala XUDAN de bin.
6 Lê belê xeynî kahînan û Lêwi-
yiyên ku xizmetê dikin, bila tu
kes nekevin mala XUDAN; dê
ew bikevinê ji ber ku pîroz in; lê
belê dê hemû netewe, notirvaniya
mala XUDAN bigirin. 7 Û Lêwi-
yiyan, her yek çekên wan di dest
de dê dorûberên qiral bigirin û her
zilamê ku bikeve malê bila bête
kuştin û hûn dema qiral bikeve û
derkeve tevî wî bibin.
8 Û Lêwiyiyan û hemûya Cihû-
dayê li gor her tiştên ku kahîn
Yehoyada emir dayiye kirin; yên
ku roja Sebtê dikevin û yên ku
roja Sebtê derdikevin, her yek
zilamên xwe rahiştin; ji ber ku
kahîn Yehoyada rê neda taximan.
9 Û kahîn Yehoyada riman û mer-
talên biçûk û mertalên mezin da
serokên sedan; vana ji berê de yên
qiral Dawid bûn û di mala Xwedê
de bûn. 10 Û wekî çekên her kesî
di destên wan de bin, hemûya ne-
tewê, ji aliyê rastê malê heta ali-
yê çepê di dirêjiya pêşkêşîgehê
û malê de bi dorûber danîn cem
qiral. 11 Û lawê qiral derxistin
û tacê danîn ser serî û şahdeyiyê
dan wî û wî kirin qiral û Yehoya-
da û lawên wî, wî mesh kirin û:
Bijî qiral! gotin.
12 Û dema Atalya dengê netewa
ku baz didin û çepikan ji qiral re
lêdixin bihîstin, hate mala XU-
DAN, cem netewê 13 û nihêrt û
a vay, qiral li cîhê ketinê li cem
sitûna xwe û serokan û yên li bori-
yê dixin li cem qiral disekiniyan û
hemûya neteweya welêt kêfxweş
dibûn û li boriyan dixistin; qesîde-
vanan jî li haletên Mûsikê dixistin
û rêvebiriya sitrana şikiryê diki-
rin. Û Atalya kincê xwe çirand û
bang kir: Xayîntî! Xayîntî! 14 Û
kahîn Yehoyada serokên sedan ên
ku li cem leşkeran bûn derxist û ji
wan re got: Ji nava refan vê pîrekê
derxînin û her zilamê ku li pêy wê
werin bila bi şûr ve bête kuştin;
ji ber ku kahîn: Wê di mala XU-
DAN de nekujin! gotibû. 15 Û ji
pîrekê re rê vekirin û dema ji De-
riyê Hespan ya mala qiral diket
hûndir, wê li wir kuştin.
16 Û Yehoyada, bona di navbera
xwe û hemûya netewê û qiral de,
bona ku bibin netewa XUDAN
peymanê danî. 17 Û hemûya ne-
tewê çûn mala Baal û wê xera ki-
rin û pêşkêşîgehên wê û pûtên wê
perçe kirin û kahînê Baal Mattan
li ber pêşkêşîgehan kuştin. 18 Û
Yehoyada, karmendên mala XU-
DAN, danîn bin destên kahînên
ku Dawid wan di mala XU-
DAN de bi çînan ve cihê kirine
û Lêwiyiyan; vana pêşkêşîgehên
şewitandinê ên XUDAN mîna
ku di zagona Mûsa de hatiye ni-
vîsandin, li gor sazûmana Dawid,

bi kêfxweşiyê û bi mûsikiyê ve
pêşkêşî bikin bûn. 19 Û bona yekî
ku ji ber her yek sedemê mindar
bûye nekevê, dergevanan danîn
deriyê mala XUDAN. 20 Û se-
rokên sedan û yên ku pêş ve tên
û waliyên netewê û hemûya nete-
wa welêt rahiştin û qiral ji mala
XUDAN ve danîn û ji deriyê jorîn
ve derbas bûn û hatin mala qiral û
qiral li ser texta qiraletiyê ve dan
rûniştin. 21 Û hemûya netewa
welêt kêfxweş bûn û bajar bêdeng
bû. Û bi şûr ve Atalya kuştibûn.

*Yoaş Perestgehê diselihîne*[1]
2.Qir 12,1-17

24
Dema Yoaş bû qiral heft
salî bû û li Orşelîmê çel sal
qiraletiyê kir û dayika wî ji Beer-
Şebayê bû û navê wê Tsîbya bû.
2 Û di hemû rojên kahîn Yehoya-
da de Yoaş ya ku di çavê XUDAN
de rast e kir. 3 Û Yehoyada du jinî
jê re stendin û bû bavên lawan û
yê qîzan.
4 Û paşî vêya wusa bû ku, Yoaş
nû kirina mala XUDAN xist dilê
xwe. 5 Û kahînan û Lêwiyiyan
civand û ji wan re got: Derkevin
bajarên Cihûdayê û bona ku mala
Xwedayê xwe her sal tamîr bikin,
ji hemûya Îsraêlê ve zîvê bidin
hev û di vî karî de lez bikin! Lê
belê Lêwiyiyan lez nekirin. 6 Û
qiral, bangî Yehoyadayê serokê
kahînan[2] kir û jê re got: Ma çima
te ji Lêwiyiyan nexwestin ku bila
nerxa ku Mûsayê qûlê XUDAN
û civaka Îsraêlê bona Çadira
Şahdeyiyê danîne, ji Cihûdayê
û ji Orşelîmê bînin? 7 Ji ber ku
lawên wê pîreka xerab, yên Atal-
ya, mala Xwedê xera kiribûn û
hemû tiştên pîroz ên mala XU-
DAN jî dabûn Baalan.
8 Û qiral emir da û sindoqekê
çêkirin û wê danîn deriyê mala
XUDAN, yê derve. 9 Û nerxa ku
Mûsayê qûlê Xwedê li çolê danîbû
ser Îsraêlê, ji bo ku bona XUDAN
bînin, li Cihûdayê û li Orşelîmê
bang kirin. 10 Û hemûya serokan
û hemûya netewê kêfxweş bûn û
anîn û heta ku sindoq tijî bû avêtin
hundirê wê. 11 Û wusa bû ku,
dema bi destê Lêwiyiyan sindoqê
ji karmendên qiral re anîn û pirr zîv
tê de dîtin, katibê qiral û karmendê
serokkahîn hatin û sindoqê vala ki-
rin û wê rahiştin û dîsa danîn cîhê
wê. Her roj wusa dikirin û pirr zîv
dan hev. 12 Û qiral û Yehoyada wê
didan kesên ku karê xizmeta mala
XUDAN dikirin û bona nû kirina
mala XUDAN. bi heqdestî avaki-
ran û xeratan û bona tamîr kirina
mala XUDAN karkerên hesin û
tûncê girtin. 13 Û karkeran xebatê
kirin û di destê wan de karê nû ki-

[1] Tamîr dike, restore dike.

[2] An jî: Yehodayê ku li seriye.

rinê pêş ve çû û mala Xwedê anîn
rewşa wê yî berê û wê zeximandin.
14 Û dema qedandin, zîvê ku ji ber
mayî ye anîn ber qiral û Yehoyada
û bi vêya bona mala XUDAN fera-
xan, bona xizmetê û bona pêşkêşî
kirina pêşkêşiyan feraxan û kevçi-
yan û feraxên zêr û zîv çêkirin. Û
di hemû rojên Yehoyada de, her tim
di mala XUDAN de pêşkêşiyên
şewitandinê pêşkêş kirin.
15 Lê belê Yehoyada kal bû û ji
rojan re têr bû û mir; dema mir
sed û sîh salî bû. 16 Û wî li ba-
jarê Dawid li cem qiralan binax
kirin, ji ber ku li Îsraêlê û di oxra
mala Xwedê de qenciyê kiribû.
17 Û paşî mirina Yehoyada, se-
rokên Cihûdayê hatin û li ber
qiral ve xwar bûn. Wê gavê qiral
wan guhdarî kir. 18 Û dev ji mala
Xwedayê bapîrên xwe XUDAN
berdan û ji Aşeran û ji pûtan re
qûlitiyê kirin û ji ber vê gunehên
wan hêrs hat ser Cihûdayê û
Orşelîmê. 19 Tevî vêya, bona ku
wan bizivirîne XUDAN ji wan re
peyxamberan şand û li dijî wan
şahdeyiyê kirin, lê belê guh ne-
dan wan.
20 Û Ruhê Xwedê bi ser Ze-
karyayê lawê Kahîn Yehoyada
ve hat û di navbera netewê de li
cîhekî bilind sekinî û ji wan re got:
Xwedê wusa dibêje: Ma çima hûn
ji emirên XUDAN wêdetir derbas
dibin û karên we qenc narin? Ji
ber ku we dev ji XUDAN berdan,
wî jî dev ji we berda! 21 Û li dijî
wî dûzenê danîn û bi emrê qiral wî
di hewşa mala XUDAN de bi ke-
viran recimandin. 22 Bi vî awayî
qiral Yoaş, xêra ku bavê Zekarya
Yehoyada jê re kiriye di bîra xwe
de neanî û lawê wî kuşt. Û dema
dimir: Bila XUDAN bibîne û lê
bigere! got.
23 Û di salvegerê de wusa bû ku,
artêşa Sûriyê li dijî wî rabû û hatin
Cihûdayê û Orşelîmê û ji nava ne-
tewê hemû serokên netewê helaq
kirin û hemû malê talanê ên ku ji
wan stendîbûn ji qiralê Şamê re
şandin. 24 Artêşa Sûriyeyiyan bi
kêm zilamî hatibûn, lê XUDAN
artêşekî zehf mezin da destên
wan; ji ber ku vana, Xwedayê
bapîrên xwe XUDAN berdabûn.
Bi vî awayî wan Yoaş dan ceza-
kirinê.
25 Û dema ji cem wî çûn; wan
di rewşekî giran de wî birîndar
şunda hiştin. Koleyên wî, ji ber
xwîna lawên kahîn Yehoyada, di
livînên wî de wî kuştin û ew mir
û wî li bajarê Dawid binax kirin,
lê belê di gorên qiralan de binax
nekirin. 26 Û yên ku li dijî wî dek
û dolavê danîne vana ne: Zabadê
lawê Şimeata pîreka Ammonî û
Yehozabadê lawê Şimrîta pîre-
ka Moabî. 27 Dema mirov were
zêdeyiya îkazên ku ji wan û ji
lawên wan re hatine kirin û dîsa

ava kirina mala Xwedê, a vay, ew
di şiroveya pirtûka qiralan de ni-
vîsandîne. Û li dêvila wî lawê wî
Amatsya bû qiral.

*Qiraletiya Amatsya ya Cihûdayê*
2.Qir 14,1-7

25 Dema Amatsya bû qiral,
bîst û pênc salî bû û li
Orşelîmê bîst û neh sal qiraletiyê
kir û dayika wî ji Orşelîmê bû û
navê wê Yehoaddan bû. 2 Û yê ku
di çavê XUDAN de rast e kir, lê
belê ne bi hemûya dil. 3 Û wusa
bû ku dema qiraletî li ser wî zexi-
mî, koleyên xwe yên ku li bavê wî
qiral xistine kuşt. 4 Lê belê lawên
wan nekuşt; lê mîna ku di zagonê
de, mîna ku di pirtûka Mûsa de
hatiye nivîsandin kir: çawa ku
XUDAN emir daye û gotiye: Dê
bav bona lawên xwe nemirin û
law bona bavên xwe nemirin: lê
dê her kes bona sûcê xwe bimire!
5 Û Amatsya Cihûdayê civand û
wan, hemûya Cihûdayê û Ben-
yamînê, li gor malên bapîran. li
gor serokên hezaran û li gor se-
rokên sedan rêz kirin û yên ku
bîst salî û jê mezintir in jimart û
wan, sê sed hezar zilamên bijartî
ên derdikevin artêşê û rim û mer-
talê mezin radihêlin dît. 6 Û bi
sed talant zîv heqdestî ji Îsraêlê.
sed hezar egîdên dilawêr girt.
7 Lê belê zilamekî Xwedê hat û jê
re got: Ya qiral! Bila artêşa Îsraêlê
tevî te neçe; ji ber ku XUDAN ne
bi Îsraêlê û bi hemûya Efrayîm re
ne! 8 Lê belê ger tu here, egîdiyê
bike, bona cengê xwurt bibe! dê
li ber neyarê te Xwedê te bixîne;
ji ber ku di Xwedê de bona alîka-
riyê û bona xistinê qudret heye.
9 Û Amatsya ji zilamê Xwedê re
got: Lê belê divê bona sed talantê
ku dayîme artêşa Îsraêlê çi bête
kirin? Û zilamê Xwedê got: XU-
DAN dikare ji vêya zêdetir bide
te. 10 Û Amatsya wan, artêşa ku ji
Efrayîmê jê re hatiye, bona ku he-
rin cîhên xwe cuda kir; ji ber vêya
li dijî Cihûdayê, hêrsa wan zehf sor
bû û bi hêrsa sor vegeriyan cîhên
xwe. 11 Û Amatsya xwurtayiyê dît
û netewa xwe bir û çû Newala Xwê
û ji lawên Seîr ve li deh hezar kesî
xist. 12 Û lawên Cihûda, bi zindiyî
jî deh hezar kesî ajotin û wan birin
serê latê û ji serê latê ve avêtin jêrîn
û gişt perçiqîn. 13 Lê belê zilamên
artêşa ku Amatsya, bona pê re
neçin cengê wan şunda zivirandi-
bûn, ji Samîriyê heta Beyt-Horonê
êrîşî ser bajarên Cihûdayê kirin û
ji wan li sê hezar kesî xistin û pirr
malê talanê rahiştin.

*Pûtperestiya Amatsya û mirina wî*
2.Qir 14.8-20

14 Û paşî ku Amatsya li Edomi-
yan xist û vegeriya wusa bû, ku
îlahên lawên Seîr anî û wan ji xwe
re wekî îlah bin çikand û li ber wan

xwar bû û ji wan re buxurê vêxist.
15 Û li dijî Amatsya hêrsa XU-
DAN sor bû û jê re peyxamberekî
şand û wî jê re got: Ma çima te li
îlahên wê neteweyê geriya? Wan
netewa xwe ji destê te ve xelas
nekirin. 16 Û wusa bû ku, dema ji
qiral re digot, Amatsya jê re got:
Ma me te ji qiral re kirin şîretkir?
Dev jê berde! Ma çima tuyê bête
lêxistin? Û peyxamber dev jê ber-
da û got: Ez dizanim ku Xwedê
bona helaq kirina te biryarê daye,
ji ber ku te vêya kir û şîreta min
guhdarî nekir!
17 Û qiralê Cihûdayê Amatsya
şêwirî û ji qiralê Îsraêlê Yoaşê
lawê Yehoahazê, lawê Yehû re
şand û: Were, em rûbirû bi hev
re dîtinekê bikin! got. 18 Û qiralê
Îsraêlê Yoaş, ji qiralê Cihûdayê
Amatsya re şand û got: Deviya
ku li Lubnanê ye, ji dara erzê ya
Lubnanê ye şandiye: Qîza xwe
bi jinitî bide lawê min! gotiye û
heywanekek beyarê ya li Lub-
nanê ye derbas bû û deviyê di bin
lingên xwe de eciqand[1]. 19 A vay,
tu dibêje ku me li Edomê xistine!
û bona pesnahiyê dilê te, te bilind
dike; niha li mala xwe rûnê; ma
çima tu, bona ku tevî Cihûdayê
bikeve xwe davêje asîwê?
20 Lê belê Amatsya guhdarî ne-
kir; ji ber, bona ku wî bide destên
neyarên wî, ev kar ji Xwedê ve
bû, ji ber ku li îlahên Edomê ge-
riyabûn. 21 Û qiralê Îsraêlê Yoaş
derket û pê re, qiralê Cihûdayê
Amatsya, li bajarê Beyt-Şemeşa
Cihûdayê rûbirû hev dîtin. 22 Û
Cihûda li ber Îsraêlê xera bû û
her kes reviyan çadirên xwe. 23
Û qiralê Îsraêlê Yoaş, qiralê Cihû-
dayê Amatsyayê lawê Yoaşê, lawê
Yehoahaz li Beyt-Şemeşê girt û wî
anî Orşelîmê û dîwarê Orşelîmê ji
deriyê Efrayîmê heta deriyê qo-
zîkê, çar sed gezî xera kir. 24 Û
li mala Xwedê, hemû zêr û zîv û
hemû feraxên ku di destê Obêd-
Edom de ne û hemû xezîneyên
mala qiral û gerewan[2] rahişt û ve-
geriya Samîriyeyê.
25 Û qiralê Cihûdayê Amatsyayê
lawê Yoaş, paşî mirina qiralê Îs-
raêlê Yoaşê lawê Yehoahaz, panz-
deh sal jiyana xwe domand. 26 Û
karên Amatsyayê yên şunda mayî-
ne, karên wî yên pêşîn jî, yên paşîn
jî, a vay, ma ew di pirtûka qiralên
Cihûdayê û Îsraêlê de ne nivîsan-
dîne? 27 Û ji destpêka ku Amatsya
ji pêy XUDAN ve çewt bûyî, li
Orşelîmê, jê re dek û dolav danîn
û reviya Lakîşê; lê belê li pêy wî
şandin Lakîşê û li wir wî kuştin.
28 Û wî li ser hespan anîn û wî li
bajarê Cihûdayê, li cem bapîrên
wî binax kirin.

1 Cût, pan kir, an jî: Perçiqand.

2 Mişkane, rehîn.

*Qiraletiya Ûzziya ya Cihûdayê*
2.Qir 15,1-4

26 Û hemûya netewa Cihû-
dayê Ûzziya girtin û ew
şanzdeh salî bû û li dêvila bavê wî
Amatsya, wî kirin qiral. 2 Yê ku
Elot ava kiriye ew e û paşî ku bi
bapîrên xwe qiralan re radiket, wê
dîsa anî bin serweriya Cihûdayê.
3 Dema Ûzziya bû qiral şanzdeh
salî bû û li Orşelîmê pêncî û du
sal qiraletiyê kir û dayika wî ji
Orşelîmê bû û navê wê Yekîlya
bû. 4 Û li gor her tiştên ku bavê
wî Amatsya çêkiriye, yên ku di
çavên XUDAN de rast e kir. 5 Û
di rojên Zekaryayê ku di zanîna
Xwedê de wî perwerde dike de
dest bi lêgerîna Xwedê kir û di
rojên ku li XUDAN digeriya de
Xwedê karê wî serfiraz kir.
6 Û derket û li dijî Filistiyan cengê
kir û dîwarê Gatê û dîwarê Yabne û
dîwarê Aşdodê xera kir û li welatê
Aşdodê û di nava Filistiyan de ba-
jaran ava kir. 7 Û li dijî Filistiyan
û li dijî Erebên ku li Gûr-Baalê
rûdinin û li dijî Mûniyan Xwedê
alîkariyê bi wî re kir. 8 Û Ammo-
niyan xelatan dan Ûzziya û heta
cihê ku ketina Misirê navê wî be-
lav bû; ji ber her ku çû xwurt bû. 9
Û Ûzziya li Orşelîmê, li ser deriyê
qozîkê û li ser Deriyê Newalê û
li ser quncîka dîwar qûleyan ava
kir û wan zeximand. 10 Û li çolê
qûleyan ava kir û gellek sarincan
kola, ji ber ku li Şefelayê û li deştê
pirr heywanên wî û li çiyayê û li
Karmelê cotkar û rezvanên wî he-
bûn; ji ber ku wî ji bikaranîna axê
hez dikir. 11 Û artêşa Ûzziya ya
ku cengê dikir hebû; di bin des-
tê Hananyayê ji serokên qiral in
de, li gor jimartina bi destên katib
Yeîel û karmend Maaseya hatine
çêkirin liq bi liq derdiketin cengê.
12 Hemûya serokên mala bapîran,
hejmara egîdên dilawêr du hezar
û şeş sed bûn. 13 Û di bin destê
wan de bona ku li dijî neyar alî-
kariyê bi qiral re bikin, artêşek sê
sed û heft hezar û pênc sed kesî,
ya bi quwetekî mezin cengê dike
hebû. 14 Û Ûzziya ji wan re, ji
hemûya artêşê re, mertalan û ri-
man û serîkan û zirxan û keva-
nan û kevirên qûsikê amade kir.
15 Û li Orşelîmê ji bo tîr û kevirên
mezin bavêjin, bona li ser qûle û
qozîkan bisekinin, makîneyên ku
bi destê zilamên bi huner ve ha-
tine nûvedan kirin çêkir. Û navê
wî heta dûra belav bû; ji ber heta
ku quwetê bibîne jê re bi mînakek
şaşkirî alîkarî hate kirin.
16 Lê belê dema quwetê dît, dilê
wî wusa bilind bû ku, gîhaşt he-
laqê û li dijî Xwedayê xwe XU-
DAN xayîntiyê kir: ji ber bona
ku buxurê li ser pêşkêşiya buxurê
vêxe ket Perestgeha XUDAN.
17 Û kahîn Azarya û tevî wî heyştê
kahînên XUDAN, zilamên egîd,

zilamên dilawêr, ji pêy wî ketin
18 û li hemberî qiral Ûzzi-
ya sekinîn û jê re gotin: Ya
Ûzziya ji XUDAN re buxur
vêxistin ne ji te re, lê ji kahînên, ji
lawên Harûn, yên ku bona buxur
vêxistinê hatine pîroz kirin re
dikeve; ji Perestgehê derkeve!
Ji ber ku te xayîntiyê kir û dê ev
kar ji XUDAN Xwedê ve mezi-
nahiyê ji te re nayne! 19 Û Ûz-
ziya hêrs bû û bona ku buxurê
vêxe di destê wî de buxurdan
hebû û li ber kahînan, di mala
XUDAN de, li ber pêşkêşîgeha
buxurê, gava li dijî kahînan hêrs
bûbû, di eniya wî de cizam der-
ket. 20 Û Serokkahîn Azarya û
hemûyên kahînan lê nihêrtin û a
vay, ew ji eniya xwe ve bi cizam
bû û bi lezî wî ji wir derxistin;
wî bi xwe jî bona derketinê lez
kir, ji ber ku XUDAN lê xistibû.
21 Û qiral Ûzziya heta roja miri-
na xwe bi cizam ma û bi cizamî
li malekek din rûnişt; ji ber ku
ji mala XUDAN ve hate birrîn
û lawê wî Yotam serweriyê li
gelê welêt ve dikir û li ser mala
qiral bû. 22 Û karên Ûzziya yên
ku şunda mayîne, karên wî yên
pêşîn jî, karên wî yên paşîn jî,
peyxamber Îşayayê lawê Amots
nivîsandiye. 23 Û Ûzziya tevî
bapîrên xwe raket û di zeviya
binax kirina qiralan de, li cem
bapîrên wî, wî binax kirin; ji ber
ku: Bi cizam e gotin û li dêvila
wî lawê wî Yotam bû qiral.

*Qiraletiya Yotam ya Cihûdayê*
2.Qir 15,32-38

27 Dema Yotam bû qiral bîst
û pênc salî bû û li Orşelîmê
şanzdeh sal qiraletiyê kir û navê
dayika wî Yerûşaya qîza Tsadok
bû. 2 Û li gor her tiştên ku bavê wî
Ûzziya kiriye, ya ku di çavê XU-
DAN de rast e kir; lê belê neket
Perestgeha XUDAN. Û netewe
hîn fesadiyê bikar dianîn. 3 Deriyê
jorîn yê mala XUDAN wî çêkir,
li ser dîwara Ofelê jî gellek tiştan
çêkir. 4 Û li çiyayiya Cihûdayê
bajaran ava kir û li daristanan birc
û qûleyan çêkir. 5 Û li dijî qiralê
lawên Ammon qiraletiyê kir û bi
ser wan ve ket. Û lawên Ammon,
di wê salê de sed talant zîv û deh
hezar olçek genim û deh hezar
olçek ceh danê. Sala duwemîn û ya
sêwemîn jî lawên Ammon ewqasî
dan wî. 6 Û Yotam xwurt bû, ji ber
ku li ber Xwedayê xwe XUDAN
ve rêyên xwe rast kir. 7 Û karên
Yotam yên şunda mayîne û hemû
cengên wî û rêyên wî, a vay, ew di
pirtûka qiralên Îsraêlê û Cihûdayê
de nivîsandîne. 8 Dema bû qiral
bîst û pênc salî bû û li Orşelîmê
şanzdeh sal qiraletiyê kir. 9 Û
Yotam tevî bapîrên xwe raket û wî
li bajarê Dawid binax kirin û li dê-
vila wî lawê wî Ahaz bû qiral.

### *Qiraletiya Ahaz ya Cihûdayê*

2.Qir 16,1-6; Îşa 7,1-17

28 Dema Ahaz bû qiral bîst salî
bû û li Orşelîmê şanzdeh sal
qiraletiyê kir û Ahaz, ya ku di çavê
XUDAN de qenc e, mîna bapîrê
xwe Dawid nekir; 2 lê belê di
rêyên qiralê Îsraêlê de meşiya, him
jî bona Baalan pûtên rijandî çêkir.
3 Û di newala lawê Hînnom de
buxurê vêxist û li gor tiştên mek-
rûh ên netewên ku XUDAN wan
ji ber lawên Îsraêl ve qewitand,
lawên xwe di agir de şewitand.
4 Û di cîhên bilind de û li ser giran
û di bin her darê hêşîn de qurban
serjêkir û buxurê şewitand.
5 Ji ber vê yekê Xwedayê wî XU-
DAN wî da destê qiralê Sûriyê û
li wî xistin û jê pirr dîlan birin û
wan anîn Şamê. Û ew bi xwe jî bi
destê qiralê Îsraêlê ve hate dayîn û
bi lêxistinek mezin li wî xist. 6 Û
Pekahê lawê Remalya li Cihûdayê
sed û bîst hezar kesî di rojekê de
kuşt, gişt zilamên egîd bûn; ji ber
ku dev ji Xwedayê bapîrên xwe
XUDAN berda bûn. 7 Û egîdekî
Efrayîmî, Zîkrî, Maaseyayê lawê
qiral û Azrîkamê serokê mala qi-
ral û Elkanayê paşî qiral zilamê
duwemîn e kuşt.
8 Û lawên Îsraêl ji birayên xwe,
pîrekan, lawan, qîzan, du sed
hezar kesî ajotin, him jî ji wan
zehf malên talanê stendin û malê
talanê anîn Samîriyê. 9 Lê belê
li wir peyxamberekî XUDAN
hebû, navê wî Oded bû û derket
hemberî artêşa ku dihat Samîriyê
û ji wan re got: A vay, ji ber ku
Xwedayê bapîrên we XUDAN,
li dijî Cihûdayê hêrs bûye wan
dan destên we, we jî bi hêrsa ku
gîhaştiye ezmanan wan kuştin.
10 Û niha hûn difikirin ku hûn
ê gelên Cihûdayê û Orşelîmê bi
koletî û cariyetî, serê wan ji xwe
re xwar bikin; lê belê ma li dijî
Xwedayê we XUDAN gunehên
we jî nîne? 11 Û niha min guhdarî
bikin û dîlên ku we ji birayên xwe
ve girtine şunda bişînin; ji ber ku
hêrsa XUDAN ya sor li ser we
ne! 12 Û zilamên ku ji serekên
lawên Efrayîm in, Azaryayê
lawê Yohanan, Berekyayê lawê
Meşîllemot û Yehîzkiyayê lawê
Şallûm û Amasayê lawê Hadlay,
li dijî yên ku ji cengê ve tên re
rabûn 13 û ji wan re gotin: Hûn ê
sirgûnan nexin vir, ji ber, tiştê ku
hûn dixwazin bikin, hûn ê vêya jî
bi ser gunehên me û sûcên me ve
bixin, dê li dijî XUDAN gunehê
bi ser me ve bînin; ji ber ku jixwe
gunehên me pirr in û li ser Îsraêlê
hêrsa sor heye! 14 Û zilamên bi
çek sirgûnan û malê talanê danîn
ber serokan û hemûyên civakê.
15 Û zilamên ku navên wan der-
bas dibin rabûn û dîlan girtin û
ji wan, hemûyên ku tazî ne, ji
malên talanê li wan kirin û kinc û

çarox li wan kirin û dan xwarin û
vexwarin, rûn di wan dan û
hemûyên ku lawaz in li keran si-
war kirin û wan ji birayên wan re
birin Erîhayê, bajarê xurmeyan û
dîsa vegeriyan Samîriyê.
16 Di wê demê de qiral Ahaz,
bona ku alîkariyê pê re bike ji qi-
ralên Asûrê re şandin. 17 Ji ber ku
Edomiyan dîsa hatibûn û li Cihû-
dayê xistibûn û dîlan biribûn.
18 Û Filistiyan êrîşî ber bi ba-
jarên li Şefelayê, li başûrê Cihû-
dayê ne kiribûn û Beyt-Şemeşê
û Ayyalonê û Gederotê û Soko
û navçeyên wê û Tîmna û navçe-
yên wê û Gîmzo û navçeyên wê bi
dest ve xistibûn û li wir rûniştin[1].
19 Ji ber qiralê Îsraêlê Ahaz,
XUDAN Cihûdayê nizm kir; ji
ber ku li Cihûdayê ji ser xwe ve
çûbû û li dijî XUDAN gellekî
xayîntiyê kiribû. 20 Û qiralê
Asûrê Tîlgat-Pîlneser hate cem
wî û zorê da wî û quwetê neda wî.
21 Ji ber ku Ahaz ji mala XUDAN
û ji mala qiral û ji serokan parê da
hev û wê da qiralê Asûrê; lê belê
alîkariya karê wî nekir.
22 Qiral Ahaz, a vay ew qiral Ahaz,
di dema tengasiya xwe de, xayîn-
tiya xwe ya ku li dijî XUDAN e,
zêde kir. 23 Û ji îlahên Şamê ên
ku lê xistine re qurban serjê kir û
got: Madem ku îlahê qiralên Sûri-
yê alîkariyê bi wan re kirin, bona
ku alîkariyê bi min re bikin, ez ê jî
ji wan re qurbanê serjê bikim. Lê
belê ew bûn sedema ketina wî û
hemûya Îsraêlê. 24 Û Ahaz feraxên
mala Xwedê da hev û feraxên
mala Xwedê perçe kir û deriyên
mala XUDAN girt û li her qozîkên
Orşelîmê bona xwe pêşkêşîgehan
çêkir. 25 Û bona ji îlahên wekî din
re buxurê bişewitînin di her bajarên
Cihûdayê de cîhên bilind çêkir û
Xwedayê bapîrên xwe XUDAN bi
hêrs kir. 26 Û karên wî yên şunda
mayîne û hemû rêyên wî, rêyên wî
yên pêşîn û yên paşîn, a vay, ew di
pirtûka qiralên Îsraêlê de nivîsan-
dîne. 27 Û Ahaz tevî bapîrên xwe
raket û wî li Orşelîmê, di bajêr de
binax kirin; ji ber ku wî nebirin
goristana qiralên Îsraêlê û li dêvila
wî, lawê wî Hîzkiya bû qiral.

*Qiraletiya Hîzkiya ya Cihûdayê*
2.Qir 18,1-6

29 Dema Hîzkiya bû qiral bîst
û pênc salî bû û li Orşelîmê
bîst û neh sal qiraletiyê kir û navê
dayika wî, Abiyaya qîza Zekarya
bû. 2 Û li gor her tiştên ku bapîrê
wî Dawid kiriye, ya ku di çavê
XUDAN de rast e kir. 3 Di yek
saliya qiraletiya xwe de, di meha
yekem de, deriyên mala XUDAN
vekir û wan selihand. 4 Û kahînan
û Lêwiyiyan anî hundir û wan li
qada rojhilatê civand 5 û ji wan re

1 An jî: Bi cîh bûn.

got: Ya Lêwiyiyan, min guhdarî
bikin, niha xwe pîroz bikin û mala
Xwedayê bapîrên xwe XUDAN
pîroz bikin û ji cîhê pîroz ve pî-
sitiyê derxînin! 6 Ji ber ku bavên
me xayîntiyê kirin û ya ku di çavê
Xwedayê me XUDAN de xerab
e kirin û dev ji wî berdan û wecê
xwe ji şunwara XUDAN ve zivi-
randin û paşiyên xwe danê. 7 De-
riyên eywanê jî girtin û qendîlan
tefandin û li cîhê bilind ji Xwe-
dayê Îsraêlê re buxurê vênexistin
û pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş
nekirin. 8 Û bi ser Cihûdayê û
Orşelîmê ve hêrsa XUDAN hat,
wan dan biçûkdîtinê û şaşmayînê,
ji wan re hate fikandin, ka çawa
ye, hûn bi çavên xwe dibînin. 9 Û
a vay, bavên me bi şûran ketin û
lawên me û qîzên me û jinên me ji
ber vê yekê li sirgûnê ne. 10 Bona
ku hêrsa wî ya sorbûyî ji me vege-
re, niha bi Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN re peyman danînê xistime
aqilê xwe. 11 Ya lawên min, niha
bêxemî mekin, ji ber ku XUDAN.
bona ku hûn jê re xizmetê bikin û
buxurê vêxin, bona hûn li ber wî
bisekinin û jê re xizmetê bikin we
hilbijart!
12 Û Lêwiyiyan, ji lawên Kohatî,
Mahatê lawê Amasay û Yowêlê
lawê Azarya û ji lawên Merarî,
Kîşê lawê Abdî û Azaryayê lawê
Yehallel û ji Gerşoniyan Yoahê
lawê Zîmman û Edenê lawê Yoah
13 û ji lawên Elîtsafan Şîmrî û
Yeûel û ji lawên Asaf Zekarya
û Mattanya 14 û ji lawên He-
man Yehûel û Şîmeyî û ji lawên
Yedûtûn Şemaya û Ûzzîel rabûn.
15 Û birayên xwe civandin û xwe
pîroz kirin û li gor gotinên XU-
DAN û emrê qiral bona ku mala
XUDAN paqij bikin ketin hundir.
16 Û kahînan, bona ku aliyê hun-
dirê mala XUDAN paqij bikin
ketin wir û hemû mindariya ku li
Perestgeha XUDAN dîtine, der-
xistin hewşa mala XUDAN. Û
Lêwiyiyan, bona ku derxînin der-
ve, newala Kîdronê wan rahiştin.
17 Û di roja yekemîn ya meha
yekem de dest bi pîroz kirinê ki-
rin û di roja heyştemîn ya mehê
de hatin eywana XUDAN û di
heyşt rojî de mala XUDAN pîroz
kirin û di roja şanzdehan ya meha
yekemîn de qedandin. 18 Û ketin
hundirê qesrê, cem qiral Hîzkiya
û gotin: Me, hemûya mala XU-
DAN û pêşkêşîgeha pêşkêşiya
şewitandinê û hemû taximên wê
û sifra nanê aramiyê û hemû ta-
ximên wê paqij kirin. 19 Û hemû
taximên ku qiral Ahaz di dema qi-
raletiya xwe de bi xayîntî kirinê
avêtine, amade kirin û pîroz kirin
û a vay, ew li ber pêşkêşîgeha
XUDAN in.
20 Û qiral Hîzkiya zû rabû û se-
rokên bajêr civand û hilkişiya
mala XUDAN. 21 Û bona qira-

letiyê û bona perestgehê û bona
Cihûdayê wekî pêşkêşiya gunehê,
heft ga û heft beran û heft berxik
û heft heb nêrî anîn. Û bona ku
li ser pêşkêşîgeha XUDAN wan
pêşkêş bikin emir da lawên Harûn,
kahînan. 22 Û ganêran serjê kirin
û kahînan xwînê rahiştin û wê li
pêşkêşîgehê reşandin û beranan
serjê kirin û xwînê li pêşkêşîgehê
reşandin û berxikan serjê kirin û
xwînê li pêşkêşîgehê reşandin.
23 Û li ber qiral û civakê wekî
pêşkêşiya gunehê nêriyan nêzîk
anîn û destên xwe danîn ser wan
24 û kahînan wan serjê kirin û
bona ji bo hemûya Îsraêlê bibe
kefaret li ser pêşkêşîgehê xwîna
wan kirin pêşkêşiya gunehê; ji ber
qiral emir dabû ku, bila pêşkêşiya
şewitandinê û pêşkêşiya gunehê
bona hemûya Îsraêlê bête kirin.
25 Û li gor emrê Gadê ku Dîtiyê
Dawid e û yê qiral e û li gor pey-
xamber Natan Lêwiyiyan bi zîlan
û bi santûran û bi çenkan ve xistin
mala XUDAN; ji ber ku ev emir, bi
navdîtiya peyxamberên wî, ji XU-
DAN bû. 26 Û Lêwiyiyan bi haletên
mûsikî yên Dawid û kahînan bi bo-
riyan sekinîn. 27 Û Hîzkiya, bona
ku pêşkêşiya şewitandinê li ser
pêşkêşîgehê bête pêşkêş kirin emir
da. Û dema dest bi pêşkêşî kirina
pêşkêşiya şewitandinê bû, bi bori-
yan û bi haletên mûsikî yên Dawi-
dê qiralê Îsraêlê, qesîdeya XUDAN
jî dest pê kir. 28 Û hemûya netewê
secde kirin û qesîdevanan qesîde
xwendin û yên ku li boriyê dixin li
boriyê xistin; hemûyên vana heta
ku pêşkêşiya şewitandinê bê qe-
dandin dom kirin.
29 Û dema karê pêşkêşîkirinê
qedandin, qiral û hemûyên ku li
cem in xwar bûn û secde kirin.
30 Û qiral Hîzkiya û serokan,
bona ku bi gotinên Dawid û
Asafê ku Dibîne ve ji XUDAN
re şikiryê bikin, emir dan Lêwiyi-
yan. Û bi kêfxweşiyê hemd kirin
û serî xwar kirin û secde kirin.
31 Û Hîzkiya bersivê da û got:
Niha, we xwe ji XUDAN re tir-
xan kirin; nêzîk bibin û qurba-
nan û pêşkêşiyên şikiryê ji mala
XUDAN re bînin. Û civak qur-
banan û pêşkêşiyê şikiryê anîn û
hemûyên ku dilên wan bi xwes-
tek in pêşkêşiyên şewitandinê
anîn. 32 Û hejmara pêşkêşiyên
şewitandinê, ên ku civakê anî-
ne heftê ganêr, sed beran, du
sed berxik bûn; hemûyên vana,
bona pêşkêşiya ku ji XU-
DAN re tête şewitandinê bûn.
33 Û heywanên ku hatine pîroz
kirin, şeş sed dewar û sê hezar mîh
bûn. 34 Lê kahîn hindik bûn û
hêz neanîn ku hemû pêşkêşiyên
şewitandinê bugurin û heta ku kar
bête qedandin û heta ku kahîn-
an xwe pîroz bikin birayên wan
Lêwiyiyan alîkariyê bi wan re

kirin; ji ber ku di xwe pîrozkirinê de Lêwiyî ji kahînan zêdetir dilrast bûn. 35 Û donê pêşkêşiyên xweşiyê û tevî pêşkêşiyên dirije yên her pêşkêşiyên şewitandinê, pêşkêşiyên şewitandinê jî pirr bûn. Bi vî awayî xizmeta mala XUDAN kirin dorê. 36 Û ji ber tiştên ku Xwedê bona netewê amade kiriye, Hîzkiya û hemûya netewê kêfxweş bûn; ji ber ku kar nişka ve bûbû.

*Hîzkiya Cejna Fisihê Pîroz dike*

30 Û Hîzkiya, bona ji Xwedayê Îsraêlê XUDAN re Fisihê çêbikin werin mala XUDAN ya li Orşelîmê ye, agahiyê ji hemûya Îsraêlê û Cihûdayê re şand û ji Efrayîm re û Manaşşe re jî nameyan nivîsand. 2 Ji ber ku li Orşelîmê qiral û serokên wî û hemûya civakê bona ku Fisihê di meha duwemîn de çêbikin bi hev re şêwirîbûn. 3 Ji ber ku, hîn qasî têrê bike kahînan xwe pîroz nekiribûn û ji ber ku netewe li Orşelîmê neciviyabûn, wê gavê wê çênekirin. 4 Û ev tişt di çavê qiral de û di çavê hemûya civakê de rast bû. 5 Û bona ku werin û li Orşelîmê ji Xwedayê Îsraêlê XUDAN re Fisihê çêbikin, biryarê dan ku dê ji Beer-Şebayê heta Danê li hemûya Îsraêlê bang bikin; ji ber mîna ku ji berê ve hatiye nivîsandin nekiribûn. 6 Û şandiyan tevî nameyên ku ji destên qiral û serokên wî ne, li gor emrê qiral li hemûya Îsraêl û Cihûdayê hol bûn û gotin: Ya lawên Îsraêl! vegerin Xwedayê Birahîm, Îshaq û Îsraêlê XUDAN, dê ew jî vegere yên ku ji destên qiralên Asûrê reviyane, xelas bûne û ji ber we mayîne re. 7 Û nebin mîna bav û birayên xwe yên ku li dijî Xwedayê bapîrên xwe XUDAN ve xayintiye kirine, wusa ku, mîna hûn dibînin, XUDAN wan daye şaşiyê! 8 Niha, mîna bavên xwe stû hişk nebin; lê belê dest bidin XUDAN û bikevin perestgeha wî ya ku abadîn wê pîroz kiriye û ji Xwedayê xwe XUDAN re qûlitiyê bikin û dê hêrsa wî ya sor ji ser we vegere! 9 Ji ber ku gava hûn vegerin XUDAN, dê birayên we û lawên we li ber yên ku wan sirgûn kirine dilovaniyê bibînin û vegerin vî welatî; ji ber ku Xwedayê me XUDAN xêrê dike û zehf heyfa wî pê tê û ger hûn vegerin wî, wecê xwe ji we nazivirîne!

10 Û şandî li warê Efrayîm û Manaşşeyê û heta Zebûlûnê ji bajêr derbasî bajêr bûn; lê belê bi wan keniyan û qerfên xwe bi wan re kirin. 11 Lê ji Aşerê û ji Manaşşeyê û ji Zebûlûnê hinek kes kubrên xwe şikandin û hatin Orşelîmê. 12 Bona ku yek dilekî bide Cihûda

jî, ji bo emirên qiral û serokan yên
li gor gotina XUDAN in bînin cîh,
destê Xwedê li ser wan bû.
13 Û di meha duwemîn de bona
ku cejna nanê bêhavên li Orşelîmê
çêbikin, gellek netewe, civakek
zehf mezin civiyan. 14 Û rabûn
û pêşkêşîgehên ku li Orşelîmê
ne, rakirin û hemû pêşkêşîgehên
buxurê rakirin û avêtin newala
Kîdronê. 15 Û di çardeh rojiya
meha duwemîn de qurbanê Fisihê
serjê kirin û kahînan û Lêwiyi-
yan şerm kirin û xwe pîroz kirin û
pêşkêşiyên şewitandinê anîn mala
XUDAN. 16 Û li gor ûsilên xwe, li
gor zagona Mûsayê zilamê Xwedê
sekinîn; kahînan xwîna ku ji Lêwi-
yiyan stendibûn reşandin. 17 Ji ber
ku di netewê de gellekên ku xwe
pîroz nekirine hebûn; ji ber vê yekê
karê serjêkirin û wan ji XUDAN re
pîroz kirina her berxikê Fisihê ên
zilamê ne paqij e li ser Lêwiyiyan
bû. 18 Ji ber ku ji netewê civa-
kek mezin, gellekên ji Efrayîm û
Manaşşeyê, ji Îssakar û Zebûlûnê
ne, xwe paqij nekiribûn, lê belê
wekî ne li gor ya ku hatiye nivîsan-
diye, Fisihê xwarin. 19 Ji ber ku
Hîzkiya ji bona wan dua kir û got:
Bila XUDAN Xwedê, her kesê ku
li gor paqijbûna perestgehê paqij
nebûye, lê belê dilê xwe bona lê-
gerîna Xwedayê bapîrên xwe ama-
de kiriye, XUDANê qenc efû bike!
20 Û XUDAN, Hîzkiya bihîst û li
netewê borand. 21 Û lawên Îsraêl,
ên ku li Orşelîmê ne, heft roj cejna
nanê bêhavên bi kêfxweşiyek me-
zin çêkirin û Lêwiyiyan û kahînan
bi haletên mûsikiyê ên ku dengên
wan bilind in her roj ji XUDAN re
şikiryê dikirin. 22 Û Hîzkiya ji dilê
hemû Lêwiyiyên ku di xizmeta
XUDAN de fêhmkariya wan qenc
e re got. Û bi serjêkirina qurbanê
xweşiyê û bi şikirî kirina Xwedayê
bapîrên xwe XUDAN, di heft rojê
cejnê de xwarin.
23 Û hemûya netewê, bona ku
heft rojê din jî çêbikin di nav
hev de bi hev re şêwirîn û bi
kêfxweşiyê heft rojê din kirin.
24 Ji ber ku qiralê Cihûdayê Hîz-
kiya bona pêşkêşîkirinê hezar
ganêr û heft hezar mîh dan civakê
û serokan hezar ganêr û deh he-
zar mîh da civakê û gellek kahîn-
an xwe pîroz kirin. 25 Û hemûya
civaka Cihûdayê û kahînan û
Lêwiyiyan û hemûya civaka ku
ji Îsraêlê hatine û mêvanên ku ji
warê Îsraêlê ve hatine û li Cihû-
dayê rûdiniştin, kêfxweş bûn.
26 Û li Orşelîmê kêfxweşiyek
mezin çêbû; ji ber ku ji rojên Silê-
manê lawê Dawidê qiralê Îsraêlê
ve, li Orşelîmê mîna vêya nebû.
27 Û kahînan, Lêwiyiyan, rabûn
û netewê pîroz kirin û dengên
wan hate bihîstin û duayên wan
hilkişiya şunwara pîroz ya Xwe-
dê, ezmanan.

*Hîzkiya Qaîdeyên ji bo xizmeta
Peresigehê bi rêk û pêk dike*
Neh 13,10-14

31 Û dema hemûya ev kar
hate qedandin, hemûya
Îsraêla ku li wir e, hilkişiyan ba-
jarên Cihûdayê û kevirên çikandî
şikandin û Aşêran jêkirin û heta ku
li hemûya Cihûdayê û Benyamînê
û li Efrayîm û Manaşşeyê cîhên
bilind û pêşkêşîgehan qedandin,
wan xera kirin. Û hemûyên lawên
Îsraêl, her kes vegeriyan milkên
xwe, bajarên xwe.
2 Û Hîzkiya, li gor nobedariyên
wan, taximên kahînan û Lêwiyi-
yan, bona pêşkêşiyên şewitandinê
û pêşkêşiyên xweşiyê, bona xiz-
met kirinê û bona pêşkêşîkirina
şikiryê û bona di deriyên qesra
XUDAN de şikiryê kirinê, him
kahînan, him jî Lêwiyiyan, her
kesî li gor xizmeta wan danîn.
3 Û bona pêşkêşiyên şewitandinê,
pêşkêşiyên şewitandinê ên ku si-
beh û êvarê li gor ku di zagona
XUDAN de nivîsandî ye û bona
pêşkêşiyên şewitandinê ên rojên
Sebtê û yên serê mehan û hinek
cejnên hatine eşkerekirin, qiral
para xwe jî ji malê xwe da. 4 Û
bona ku bi zexmî bi zagona XU-
DAN ve bigirin, ji bo para kahîn-
an û Lêwiyiyan bidin, emir da
netewa ku li Orşelîmê rûdinin.
5 Û dema ev emir bi der û hêlê
ve belav bû, lawên Îsraêl nûberên
genim, xemra nû û rûn û hungiv
û hemûya zadên zeviyê bi zêdeyî
dan û dehekiya her tiştî bi zêdeyî
anîn. 6 Û lawên Îsraêl û Cihû-
dayê, ên ku li bajarên Cihûdayê
rûdinin, wan jî deheka dewaran
û mîhan û deheka tiştên pîroz ên
ji Xwedayê xwe yî XUDAN re
pîroz kirine anîn û bi kom komî
dan. 7 Di meha sêwemîn de dest
bi danîna bingeha koman kirin û
di meha heftemîn de qedandin.
8 Û Hîzkiya û serokan hatin û ko-
man dîtin û XUDAN pîroz kirin
û netewa wî Îsraêlê pîroz kirin.
9 Û Hîzkiya di derheqê koman de
ji kahînan û Lêwiyiyan ve pirsî.
10 Û Serokkahîn Azaryayê ji mala
Tsadok e, bersivê da wî û got: Cer-
gî dest bi anîna pêşkêşiyan ji mala
XUDAN re kirine, me xwarin û
em têr bûn û pirr jî ji ber hiştin;
ji ber ku XUDAN netewa xwe
pîroz kir; yê ku ji ber mayî ye jî
komekî mezin e.
11 Û Hîzkiya, bona ku odeyên
mala XUDAN amade bikin emir
da û amade kirin 12 û pêşkêşiyan
û dehekan û tiştên ku hatine pîroz
kirin bi dilsoziyê anîn. Û Konan-
yayê Lêwiyî li ser vana serwer
bû û birayê wî Şimeî yê duwemîn
bû 13 û di bin destê Konanya û
birayê wî Şimeî de Yehîel û Azaz-
ya û Nahat û Asahel û Yerîmot
û Yozabad û Elîel û Îsmakya û
Mahat û Benaya, karmendên ku

ji aliyê qiral Hîzkiya û tevî wî
serwerê mala Xwedê Azarya ve
hatine wezîfedar kirin bûn. 14 Û
lawê Îmna, Koreyê Lêwiyî yê ku
di deriyê rojhilatê de dergevan e,
bona ku pêşkêşiyên XUDAN û
tiştên herî pîroz in belav bike, li
ser pêşkêşiyên ji dilên ku bona
Xwedê hatine danîn bû. 15 Û di
bin destê wî de Eden û Mînyamîn
û Yêşûa, Şemaya, Amarya û
Şekanya, di bajarên kahînan de,
li gor taximên wan ji birayên xwe
re, ji mezin re û ji biçûk re, bona
ku bi dilsoziyê belav bikin bûn;
16 xeynî vana, ji zilamên ku bi
regezê ve hatine jimartin û ji sê
salî û jê berjortir in, hemûyên ku
her roj li gor karên xwe, li gor
taximên xwe bona xizmetên xwe
yî di wezîfeyên xwe de ne, her
roj dikevin mala XUDAN 17 û
ji kahînên ku li gor mala bapîran
bi regezê ve hatine jimartin û ji
Lêwiyiyên ku di wezîfeyên xwe
de li gor taximên xwe bîst salî û
jê wêdetir in 18 û ji hemû zarok
û jin û law û qîzên ku di hemûya
netewê de bi regezê ve hatine
jimartin re, belav dikirin; ji ber ku
di pîroziyê de bi dilsozî xwe pîroz
kirin. 19 Û lawên Harûn ên ku di
çêregehên beyarên bajarên xwe de
ne, bona kahînan li her bajarî, di
nav kahînan de ji hemû zilaman re
û ji heçiyên ku di nava Lêwiyiyan
de bi regezê ve hatine jimartin,
bona ku parên wan bidin hemûyan
zilamên ku bi navên xwe ve tên
bangkirin hebûn.
20 Û Hîzkiya, li hemûya Cihûdayê wusa kir û li cem Xwedayê
xwe XUDAN ve yê baş û rast û
heq e kir. 21 Û di her karê ku bona
di xizmeta mala Xwedê de û di
zagonê de û di emiran de li Xwedayê xwe bigere dest pê kiriye bi
hemûya dilê xwe ve kir û karê wî
qenc çû.

*Gefa Sanherîb*

2.Qir 18,13-37; Îşa 36,1-22

32 Û paşî van karan û vê dilsoziyê qiralê Asûrê Sanherîb
hat û ket Cihûdayê û li dijî bajarên
bi dîwar artêşgehê danî û wan bi
dest ve xistinê kir aqlê xwe. 2 Û
dema Hîzkiya dît ku Sanherîb hat
û bona ku li dijî Orşelîmê cengê
bike berê xwe dayê, 3 bona ku
avên çavkaniyên derveyî bajêr
bigirin bi serok û egîdên xwe re
şêwirî û wan alîkariyê bi wî re
kirin. 4 Û pirr netewe civiyan
û bi gotina: Ma dê qiralê Asûrê
werin û çima ava zêde bibînin?
hemû çavkaniyan û newala ku di
nava welat de diherike girtin. 5 Û
Hîzkiya quwetê dît û hemû cihên
xerabûyî yên dîwêr ava kir û wê
heta qûleyan bilind kir û ji derve
dîwarekî din ava kir û Millloya
ku li bajarê Dawid e jî zeximand
û pirr çek û mertal çêkir. 6 Û

serokên cengê danî ser netewê û
wan li cem xwe cem derê qada
bajêr civand û ji dilên wan re axi-
fî û got: 7 Xurt û dilawêr bin! Ji
qiralê Asûrê û ji hemû neteweya
ku li cem wî ne metirsin û neke-
vin bêzariyê; ji ber ku yê bi me re
ye, ji yê ku bi wî re ye mezintir e;
8 yê ku bi wî re ye bazûyê ji goşt e,
lê belê Xwedayê me, yê bona ku
alîkariyê bi me re bike û cengên
me bike bi me re ye, XUDAN e!
Netewe jî bi gotinên Hîzkiyayê
qiralê Cihûdayê ve ewle bûn.
9 Paşî vêya Sanherîbê qiralê
Asûrê, bi hemû quweta ku pê re
ye, dema li ber Lakîşê bû, ji qiralê
Cihûda Hîzkiya û ji hemû Cihû-
daya ku li Orşelîmê ne re koleyên
xwe şand û got: 10 Qiralê Asûrê
Sanherîb wusa dibêje: Gelo hûn
bi çi ewle dibin ku bi der û hêl
girtî li Orşelîmê rûdinin? 11 Ma
Hîzkiya, bi gotina: Dê Xwedayê
me XUDAN me ji destê qiralê
Asûrê ve xelas bike, bona ku
we bi xelayê û di tîbûnê de bide
destê mirinê we naxapîne? 12
Ma yê ku cîhên wî yên bilind û
pêşkêşîgehên wî rakiriye û yê ku
ji Cihûda re û Orşelîmê re bi go-
tina: Hûn ê li ber vê pêşkêşîgehê
peristinê bikin û li ser wê buxurê
vêxin! emir dayiye, ma ne ev Hîz-
kiya ye? 13 Ma qey hûn nizanin
ez û bapîrên min, me çi bi hemû
neteweyên welatan re kirine?
Îlahên gelên wan welatan qet hêz
anîn ku welatê wan ji destê min
ve xelas bikin? 14 Di nava hemû
îlahên wan gelên ku bapîrên min
bi tûmî wan helaq kirine de kîjanê
hêz anî ku netewa xwe ji destê
min xelas bike ku, bila Xwedayê
we, we ji destê min ve xelas bike?
15 Û niha bila Hîzkiya wusa xa-
pandinê li we neke û bila we
wusa nexapîne! Û pê bawer ne-
bin! ji ber ku ji îlahên netewekê
û yê welatekî qet tu carî hêz neanî
ku netewa xwe ji destê min û yên
bapîrên min ve xelas bike; ka li ku
ma ku bila Xwedayê we, ji destê
min we xelas bike!
16 Û koleyên wî, li dijî XUDAN
Xwedê û qûlê wî Hîzkiya ve hîn
pirr tiştî gotin. 17 Û di nameyên
ku bona Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN biçûk bixîne û li dijî wî
bibêje nivîsandibûn de wusa got:
Çawa ku îlahên netewên welatan
hêz neanîn ku gelên xwe ji destê
min ve xelas bikin, dê Xwedayê
Hîzkiya jî nikaribe gelê xwe ji
destê min ve xelas bike. 18 Û
bona ku bajêr bistînin, ji bo gelê
Orşelîmê ên ku li ser dîwar in
bitirsînin û bona ku wan bixînin
teşqelê, bi dengekî bilind û bi zi-
manê Cihûdî bi wan re qêriyan.
19 Li dijî Xwedayê Orşelîmê jî,
wekî îlahên neteweyên dinê, ên
ku karê destê mirovan in dibêjin,
gotin.

ku ji Xwedayê Îsraêlê XUDAN re
qûlitiyê bikin, emir da Cihûdayê.
17 Tevî ku wusa be, netewe hîn li
cîhên bilind qurbanê serjê dikirin,
lê belê tenê ji Xwedayê xwe XU-
DAN re.
18 Û karên Manaşşe, yên şunda
mayîne û duaya ku ji Xwedayê
xwe re kiriye û gotinên yên ku
Dibînin ên ku bi navê Xwedayê
Îsraêlê XUDAN, jê re gotine, a
vay, ew di nava karên qiralên Îs-
raêlê de nivîsandîne. 19 Û duaya
wî û bihîstina duaya wî û hemû
sûcê wî û xayîntiya wî û berî ku
xwe nizm bike, çêkirina wî ya
cîhên bilind û cîhên ku Aşeran û
pûtên qewartî danîne, a vay, ev di
dîroka Hozay de nivîsandîne. 20
Û Manaşşe tevî bapîrên xwe raket
û wî di mala wî de binax kirin û li
dêvila wî lawê wî Amon bû qiral.

*Qiraletiya Amon ya Cihûdayê*
2.Qir 21,19-26

21 Dema Amon bû qiral, bîst û
du salî bû û li Orşelîmê du sal qi-
raletiyê kir. 22 Û mîna bavê xwe
Manaşşe, ya ku di çavê XUDAN
de xerab e kir û Amon ji hemû
pûtên qewartî ên ku bavê wî wan
çêkiribû re qurban serjê kir û ji
wan re qûlitiyê kir. 23 Û mîna ku
bavê wî Manaşşe xwe nizm kir,
wî xwe li ber XUDAN nizm ne-
kir; lê belê Amon, her ku çû zêde-
tir xerabiyê kir. 24 Û koleyên wî li
dijî wî dûzenê danîn û wî di mala
wî de kuştin. 25 Lê belê netewa
welêt, li hemûyên ku li dijî qiral
Amon re dek û dolavê danîne xis-
tin û netewa welêt li dêvila wî,
lawê wî Yoşiya kirin qiral.

*Qiraletiya Yoşiya ya Cihûdayê*
2.Qir 22,1-7

34 Dema Yoşiya bû qiral
heyşt salî bû û li Orşelîmê
sîh û yek salî qiraletiyê kir. 2 Û
ya ku di çavê XUDAN de rast
e kir û di rêyên bapîrê xwe Da-
wid de meşiya û bi rast û çepê
ve çewt nebû. 3 Û di heyşt sali-
ya qiraletiya xwe de, hîn ciwan
bû, dest bi lêgerîna Xwedayê
bapîrê xwe Dawid kir û di sala
donzdehan de dest pê kir û Cihû-
dayê û Orşelîmê, ji cîhên bilind
û ji Aşeran û ji pûtên qewartî û ji
pûtên rijandî paqij kir. 4 Û li ber
wî, pêşkêşîgehên Baalan xera ki-
rin û pûtên rojê, ên ku li jor bi ser
wan ve ne jêkirin û qulipandin û
Aşeran û pûtên qewartî û pûtên
rijandî perçe kirin û wan perçi-
qandin û kirin toz û bi ser gorên
kesên ku ji wan re qurbanan ser-
jê kirine ve weşandin. 5 Û di ser
pêşkêşîgehên xwe de hestiyên
kahînan şewitandin û Cihûdayê
û Orşelîmê paqij kirin. 6 Û heta
Naftaliyê, di bajarên Manaşşe û
Efrayîm û Şimeûn de, bi dorûberdi
wêranxaneyên wan de wusa kirin.

7 Û pêşkêşîgehan xera kirin û
Aşeran û pûtên qewartî heta ku
bibin toz eciqandin û li hemûya
welatê Îsraêlê, hemûyên pûtên
rojê jêkirin û qulipandin û vege-
riya Orşelîmê.
8 Û di hîjdeh saliya qiraletiya
xwe de, paşî ku welat û xanî
paqij kir, Şafanê lawê Atsalya û
Maaseyayê serokê bajêr û bû-
yernivîs Yoahê lawê Yoahaz bona
ku mala Xwedayê xwe XUDAN
tamîr bikin şand. 9 Û hatin cem
Serokkahîn Hîlkiya û hemû zîvê
ku ji destê Manaşşe û Efrayîm û
ji yên ku bermayiyên Îsraêlê û ji
hemûya Cihûdayê û Benyamînê
û ji yên ku li Orşelîmê rûdinin,
Lêwiyiyên ku notirvanên şêmûgê
ne, dane hev û ya ku anîne mala
Xwedê, dan wî. 10 Û wê dan des-
tê karkerên ku dest bi karê mala
XUDAN kirine; ew jî dan des-
tê karkerên ku bona mala XU-
DAN nû bikin û tamîrê lê bikin
duşuxulin 11 û kevirên qewartî
û bona darbendê û bona beştên
xaniyên ku qiralên Cihûdayê,
wan xera kirine, oniyan bistînin
dan xeratan û lêkeran. 12 Û van
zilaman karên xwe bi dilsoziyê
çêkirin û serkarên ku bona kar
pêş ve bibin li ser wan in. Lêwi-
yî, Yahat û Obadyayê ku ji lawên
Merarî ne û ji lawên Kohatî Ze-
karya û Meşûllam û Lêwiyiyên
ku di hemûya haletên muzîkê de
fêhmkar in, bûn. 13 Û vana li ser
yên ku bar dikişînin jî bûn û di her
tewrê xizmetê de, hemûyên ku
kar dibînin pêş ve birin; ji Lêwi-
yiyan katiban û karmendan û der-
gevanan jî hebûn.

*Pirtûkq Zagonê dîsa tête dîtin û Yoşiya tobe dike*

2. Qir 22,8-14

14 Û dema zîvê ku anîne mala
XUDAN derxistin, kahîn Hîlkiya,
pirtûka zagona XUDAN ya ku bi
destê Mûsa ve hatiye dayîn dît.
15 Û Hîlkiya bersivê da û ji katib
Şafan re got: Di mala XUDAN de
pirtûka zagonê dîtim. Û Hîlkiya
pirtûkê da Şafan. 16 Û Şafan pir-
tûkê ji qiral re bir û agahiyê ji qiral
re anî û got: Her tiştê ku dane des-
tên koleyên te, ew wan çê dikin.
17 Û zîvê ku di mala XUDAN de
dîtin, vala kirin û wê dan destê
karmend û karkeran. 18 Û katib
Şafan ji qiral re şand û got: Kahîn
Hîlkiya pirtûkekê da min. Û Şafan
li ber qiral jê xwend. 19 Û wusa
bû ku, dema qiral gotinên zagonê
bihîst, kincê xwe çirand. 20 Û qi-
ral ji Hîlkiya re û ji Ahîkamê lawê
Şafan re û ji Abdonê lawê Mîka
re û ji katib Şafan re û ji koleyê
qiral Asa re emir kir û got: 21 He-
rin, bona min û bona yên ku li Îs-
raêlê û li Cihûdayê ji ber mayîne,
di derheqê gotinên vê pirtûka ku
hatiye dîtin de ji XUDAN re bi-

pirsin; ji ber ku hêrsa XUDAN ya
bi ser me ve rijiyaye mezin e, ji
ber ku bapîrên me, bona li gor her
tiştên ku di vê pirtûka de nivîsan-
dîne bikin, bi gotina XUDAN ve
negirtin.
22 Û Hîlkiya û zilamên ku qiral
emir daye wan, çûn cem peyxam-
ber pîreka Hûldaya jina Şallûmê
lawê Tokhatê, lawê Hasrayê
notirvanê kinca yî. Û pîrek, li
Orşelîmê di taxa duwemîn de
rûdinişt û çawa be, wusa jê re go-
tin. 23 Û ji wan re got: Xwedayê
Îsraêlê XUDAN wusa dibêje: Ji
zilamê ku we ji min re şandine re
bibêjin, 24 XUDAN wusa dibêje:
A vay, ez ê xerabiyê bi ser vî cîhî
û li ser yên ku li vir rûdinin, hemû
naletên ku di pirtûka li ber qiralê
Cihûdayê xwendine de ne, bînim.
25 Madem ku bi hemû karên des-
tê xwe ve bona min bixeyidînin, ji
îlahên wekî din re buxurê vêxis-
tin; ji ber vê yekê hêrsa min bi ser
vî cîhî ve rijiya û dê venemire!
26 Lê belê hûn ê ji qiralê Cihû-
dayê, ê ku bona ji XUDAN bi-
pirse we şandiye re wusa bibêjin:
Xwedayê Îsraêlê XUDAN wusa
dibêje: Dema em werin gotinên
ku te bihîstine, 27 madem ku dilê
te nerm bû û li ber vê derê û li ber
yên ku li vê derê rûdinin, dema te
gotinên Xwedê bihîst û li ber min
te xwe nizm kir û kincê xwe çi-
rand û li ber min giriya, min jî te
bihîst, XUDAN emir dide. 28 A
vay, ez ê te tevî bapîrên te bikim
û dê bi xweşiyê te bixin gora te
û dê çavên te hemû asîwên ku ez
ê bi ser vir û bi ser yên ku li vir
rûdinin bînim nebînin. Û agahiyê
ji qiral re anîn.
29 Û qiral şand û hemû kalepîrên
Cihûdayê û Orşelîmê civand.
30 Û qiral, hemû zilamên Cihû-
dayê û yên ku li Orşelîmê rûdinin
û kahînan û Lêwiyiyan û ji me-
zin heta biçûk hemûya netewê
hilkişiyan mala XUDAN û hemû
gotinên pirtûka peymanê ya ku
di mala XUDAN de hatiye dîtin,
bi wan re da bihîstin û xwendin.
31 Û qiral di cîhê xwe de sekinî
û bona ku li pêy XUDAN bimeşe
û emirên wî û şahdeyiyên wî û
zagonên wî bi hemûya dilê xwe
û bi hemûya canê xwe ve bigire,
bona gotinên vê peymana ku di
vê pirtûkê de nivîsandîne bike, li
ber XUDAN peymanê birrî. 32 Û
hemûyên ku li Orşelîm û Ben-
yamînê ne, xist vê peymanê. Û
yên ku li Orşelîmê rûdinin li gor
Xwedayê bapîrên xwe, peymana
Xwedê kirin. 33 Û Yoşiya li hemû
welatên lawên Îsraêl, hemû tiştên
mekrûh rakir û ji yên ku li Îsraêlê
ne, bona ku ji Xwedayê xwe XU-
DAN re qûlitiyê bikin, ji hemûyan
re qûlitiyê dan kirin. Di hemû ro-
jên wî de ji pêy Xwedayê bapîrên
xwe XUDAN ve çewt nebûn.

*Yoşiya Cejna Fisihê Pîroz dike*
2.Qir 23,21-25

35 Û Yoşiya li Orşelîmê ji
XUDAN re Fisihê çêkir
û di roja çardeh ya meha yekem
de qurbana Fisihê serjê kir. 2 Û
kahînan danî ser wezîfeyên wan
û bona xizmeta mala XUDAN
wan xwurt kir. 3 Û ji Lêwiyiyên
ku ji XUDAN re hatine pîroz ki-
rin û hînî hemûya Îsraêlê dikin re
got: Sindoqa pîroz, deynin xani-
yê ku Silêmanê lawê Dawidê qi-
ralê Îsraêlê ava kiriye; êdî dê di
ser milên we de nebe bar. Niha ji
Xwedayê xwe XUDAN re û ji ne-
tewa wî Îsraêlê re xizmetê bikin 4
û li gor nivîsa qiralê Îsraêlê Da-
wid û li gor nivîsa lawê wî Silê-
man, ji aliyê malên bapîrên xwe
ve, xwe amade bikin! 5 Û li gor
herêmên malên bapîrên birayên
we, lawên netewê, li cîhê pîroz
bisekinin û ji Lêwiyiyan pariyek
mala bapîran bila bona her yekî
wan be. 6 Û qurbana Fisihê serjê
bikin û xwe pîroz bikin û bona ku
hûn li gor gotina XUDAN ya bi
navdîtiya Mûsa ye bikin, bona bi-
rayên xwe amadekariyê bibînin!
7 Û Yoşiya ji lawên netewê re, ji
hemûyên ku li wir in re, ji keriyê
bi hejmarî wekî sîh hezarî, gişt jî
wekî qurbana Fisihê bin, berxikan
û karikan û sê hezar jî dewar da:
ev ji malê qiral bûn. 8 Û serokên
wî jî, wekî pêşkêşiyên ji dil dan
netewê, kahînan û Lêwiyiyan.
Hîlkiya û Zekarya û Yehîel,
serwerên mala Xwedê, wekî
qurbana Fisihê, du hezar û şeş sed
berxik û karik û sê sed ganêran
dan kahînan. 9 Û Konanya û
birayên wî Şemaya û Netanel û
serokên Lêwiyiyan Haşabya û
Yeîel û Yozabad, bona ku bibe
qurbana Fisihê pênc hezar berxik
û pênc sed ganêr dan Lêwiyiyan.
10 Bi vî awayî xizmet hate ama-
de kirin û kahînan di cîhên xwe
de û Lêwiyiyan li gor taximên
xwe, li gor emrê qiral sekinîn.
11 Û qurbana Fisihê serjê kirin û
kahînan xwîna ku ji destên wan
rahiştin weşandin û Lêwiyiyan
qurbanan gurandin. 12 Û bona ku
pêşkêşiyên şewitandinê, li gor ku
di pirtûka Mûsa de nivîsandiye, ji
XUDAN re pêşkêş bikin, li gor li-
qên malên bapîran yên lawên ne-
tewê bidin, wan bi aliyekî hilanîn.
Ganêran jî wusa kirin. 13 Û qur-
bana Fisihê li gor ûsilê di agir de
sor kirin[1] û pêşkêşiyên pîroz di
beroşan de û di qazanan de û di
miqilkan de qelandin û ji hemûya
lawên netewê re bi lezî belav ki-
rin. 14 Û paşî wê bona xwe û bona
kahînan amade kirin, ji ber ku
kahînên, ji lawên Harûn heta ku
bibe şev di xebata pêşkêşî kirina
pêşkêşiyên şewitandinê û donan

1 Qewirandin.

de bûn; ji ber vê yekê, Lêwiyiyan
bona xwe û bona kahînên lawên
Harûn amadekariyê dîtin. 15 Û li
gor emrê Dawid û Asaf û Heman
û Yedûtûnê Dîtiyê qiral e, lawên
Asaf, qesîdevan li cîhên xwe bûn
û di her deriyî de dergevan he-
bûn; hewce nedikir ku ji xizmetên
cuda bibin; ji ber ku birayên wan
Lêwiyiyan bona wan amadekari-
yê dîtin.
16 Li gor emrê qiral Yoşiya, bona
ku Fisihê bike û ji bo pêşkêşiyên
şewitandinê li ser pêşkêşîgeha
XUDAN ve pêşkêş bike, hemû
xizmeta XUDAN ew roj bi vî
awayî hate amade kirin. 17 Û
lawên Îsraêl yên ku amade ne, di
wê demê de Fisihê û heft roj cejna
nanê bê hawên kirin. 18 Û ji ro-
jên peyxamber Samûel vir de, li
Îsraêlê Fisihek wusa çênebû û ji
qiralên Îsraêlê qet yek jî, Fisihek
mîna vê Fisiha ku Yoşiya û kahîn-
an û Lêwiyiyan û hemûya Cihûda
û Îsraêla ku li wir e û yên ku li
Orşelîmê rûdinin, çênekirin. 19 Ev
Fisiha di hîjdeh saliya qiraletiya
Yoşiya de hate çêkirin.

*Mirina Yoşiya*

2.Qir 23,29-30

20 Paşî hemûyên vana û amade
kirina Yoşiya ya malê, qiralê Mi-
sirê Neko, bona li cem Feratê, li
dijî Karkemîş cengê bike derket û
Hoşiya li dijî wî rabû. 21 Lê belê
qiralê Misirê şandiyan jê re şandin
û got: Ya qiralê Cihûdayê, çiyî te
ji min heye? Ez îroj ne li hemberî
te, tenê li hemberî mala ku pê re
cenga min heye diçim û Xwedê ji
min re bi gotina: Bilezîne emir da
min; ji Xwedayê tevî min e xwe
biparêze ku bila te helaq meke!
22 Û Yoşiya berê xwe jê neda
alî, lê belê bona ku bi wî re cengê
bike, qilafetê xwe guhert û go-
tinên Neko yên ku ji devê Xwe-
dê ne, guhdarî nekir û bona ku di
çemê Megîddo de cengê bike hat.
23 Û yên ku tîrê davêjin, tîr avêtin
qiral Yoşiya û qiral ji koleyên xwe
re got: Min bibin; ji ber ku ez bi
birîna xedar birîndar ketim! 24 Û
koleyên wî, wî ji erebê hilgirtin û
wî li ereba wî ya duwemîn siwar
kirin û birin Orşelîmê û mir û di
gorên bapîrên xwe de hate bin-
ax kirin. Û hemûya Cihûdayê û
Orşelîmê, bona Yoşiya şînê girtin.
25 Û Yêremya bona Yoşiya lawij
xwend û mêr û pîrek, hemû hel-
bestvanan heta îroj di lawijên xwe
de li ser Yoşiya gotine û xwendi-
na wan li Îsraêlê ji xwe re kirin
adet û a vay, ew di Lawijan[1] de
nivîsandîne. 26 Û karên Yoşiya
yên şunda mayîne û li gor ku di
zagona XUDAN de nivîsandiye
qenciyên wî 27 û karên wî, karên
wî yên pêşîn jî yên paşîn jî, a vay,

1 An jî: Di pirtûka Lawijan de.

ew di pirtûka qiralên Îsraêlê û
Cihûdayê de nivîsandîne.

*Qiraletiya Yehoahaz ya Cihûdayê*
2.Qir 23,31-37; 24,1-17

36 Û netewa welêt, Yehoaha-
zê lawê Yoşiya rahiştin û
li dêvila bavê wî, wî li Orşelîmê
kirin qiral. 2 Yehoahaz dema bû
qiral bîst û sê salî bû û li Orşelîmê
sê meh qiraletiyê kir. 3 Qiralê Mi-
sirê li Orşelîmê wî ji textê daxist
û sed talant zîv û talantek zêr bi
cezayî danî ser welêt. 4 Û qiralê
Misirê, birayê wî Elyakîm, li ser
Cihûdayê û Oreşelîmê kir qiral
û navê wî guhert û navê Yeho-
yakîm lê kir. Û Neko, birayê wî
Yehoahaz rahişt û bir Misirê.

*Qiraletiya Yehoyakîm ya Cihûdayê*

5 Dema Yehoyakîm bû qiral, bîst
û pênc salî bû û li Orşelîmê yanz-
deh sal qiraletiyê kir û ya ku di
çavê Xwedayê wî XUDAN de
xerab e kir. 6 Qiralê Babîlê Nebû-
kadnetsar li dijî wî rabû û bona ku
wî bibe Babîlê bi duqatî zincîrê wî
girê da. 7 Û Nebûkadnetsar ji ta-
ximên mala XUDAN bir Babîlê û
wan li Babîlê danî perestgeha xwe.
8 Û karên Yehoyakîm yên şunda
mayîne, tiştên mekrûh ên kirine û
xerabiya ku tê de heyî, a vay, ew
di pirtûka qiralê Îsraêl û Cihûdayê
de nivîsandîne û li dêvila wî, lawê
wî Yehoyakîn bû qiral.

*Qiraletiya Yehoyakîn ya Cihûdayê*

9 Dema Yehoyakîn bû qiral, heyşt
salî bû û li Orşelîmê sê meh û deh
roj qiraletiyê kir û ya ku di çavê
XUDAN de xerab e kir. 10 Û di
salvegerê de Nebûkadnetsar şand
û wî, tevî taximên mala XUDAN,
ên bi qîmet anî Babîlê û birayê
wî Tsedekiya li ser Cihûda û
Orşelîmê kir qiral.

*Qiraletiya Tsedekiya ya Cihûdayê*
2.Qir 24,18-20; 25,1-21; Yêr 39,1-10; Yêr 52

11 Dema Tsedekiya bû qiral, bîst
û yek salî bû û li Orşelîmê yanz-
deh sal qiraletiyê kir 12 û ya ku
di çavê Xwedayê xwe XUDAN
de xerab e kir; li ber peyxamber
Yêremyayê ku ji devê XUDAN
ve dibêje xwe nizm nekir. 13 Him
jî li dijî qiral Nebûkadnetsarê bi
mafê Xwedê sondê pê re daye
xwarin, asê bû û bona ku venege-
re Xwedayê Îsraêlê XUDAN ve
stûyê xwe hişk kir û dilê xwe hişk
kir. 14 Hemû serokên kahînan
jî, tevî netewê li gor hemû tiştên
mekrûh ên neteweyan zehf xayîn-
tiyê kirin û mala XUDAN ya ku li
Orşelîmê wî bi xwe wê pîroz ki-
ribû mindar kirin. 15 Û Xwedayê
bapîrên wan XUDAN, bi lezî kir,
şand û bi destê şandiyên xwe ve
ji wan re şand, ji ber ku heyfa wî
li netewa wî û şunwara wî ve di-
hat; 16 lê belê heta ku hêrsa XU-
DAN wekî êdî şîfê nebîne li dijî

nî pêşkêşiyên ji dil, zilamên ku li cîhê lê ne bila bi zîv û zêr û bi pertal[1] û heywanan alîkariyê pê re bikin!

*Yên li Sirgûnê ne vedigerin Orşelîmê*

5 Û serokên malên bapîrên Cihûdayê û Benyamînê û kahînan û Lêwiyiyan, hemû zilamên bona mala XUDAN ya li Orşelîmê ye ava bikin derkevin Xwedê ruhên wan hişyar kirine rabûn. 6 Û hemûyên ku li dora wan bûn, xeynî hemû pêşkêşiyên ji dil, bi feraxên zîv, bi zêr, bi pertal û bi heywanan û bi kevirên bi qîmet alîkariyê bi wan re kirin. 7 Û qiral Koreş, feraxên mala XUDAN, yên ku Nebûkadnetsar wan ji Orşelîmê derxistiye û xistiye mala îlahên xwe, derxist 8 û Koreşê qiralê Farsê vana bi destê xeznedar Mîtredat ve derxistin û wan bi hejmarî dan Şeşbatsarê qiralê Cihûdayê. 9 Û hejmara wan ev in: Sîh leganê zêrîn, hezar leganê zîv, bîst û neh kêr, 10 sîh tasên zêrîn, çar sed û deh perçe tasikên zîv ji cureyên duwemîn û hezar perçe feraxên wekî din. 11 Hemû feraxên zêr û zîv pênc hezar û çar sed perçe bûn. Dema yên sirgûnê ji Babîlê anîn Orşelîmê, Şeşbatsar hemûyên van feraxan anî.

*Lîsteya yên ku ji Sirgûnê vegeriyane*

Neh 7,6-73; Zeb 126

2 Û ji aliyên welatê ên ku ji sirgûnên Nebûkadnetsar wan ajotiye Babîlê derketine û wekî her kes ji bajarê xwe re, yên vegeriyane Orşelîmê û Cihûdayê, vana ne; 2 vana Zerûbbabel, Yêşûa, Nehemya, Seraya, Reelaya, Mordekay, Bîlşan, Mîspar, Bîgvay, Rehûm û bi Baana re hatin. Hejmara zilamên ku ji netewa Îsraêlê ne: 3 Lawên Paroş, du hezar û sed û heftê û dudo. 4 Lawên Şefatya, sê sed û heftê û dudo. 5 Lawên Arah, heft sed û heftê û pênc. 6 Lawên Pahat-Moabê ji lawên Yêşûa û Yoab, du hezar û heyşt sed û donzdeh. 7 Lawên Elam, hezar û du sed û pênce û çar. 8 Lawên Zattû, neh sed û çel û pênc. 9 Lawên Zakkay, heft sed û şêst. 10 Lawên Banî, şeş sed û çel û du. 11 Lawên Bebay, şeş sed û bîst û sê. 12 Lawên Azgad, hezar û du sed û bîst û dudo. 13 Ji lawên Adonîkam, şeş sed û şêst û şeş. 14 Lawên Bîgvay, du hezar û pênce û şeş. 15 Lawên Adîn, çar sed û pênce û çar. 16 Ji Hîzkiya lawên Ater, nod û heyşt. 17 Lawên Betsay sê sed û bîst û sê. 18 Lawên Yora, sed û donzdeh. 19 Lawên Haşûm, du sed û bîst û sê. 20 Lawên Gîbbar, nod û pênc. 21 Lawên Beytlehem, sed û bîst û sê. 22 Zilamên Netofa, pênce û şeş. 23 Zilamên Anatot, sed û bîst û heyşt. 24 Lawên Az-

1 Alav.

mavet, çel û du. 25 Lawên Kîryat-
Arîm, Kefîra û Beerot, heft sed û
çel û sê. 26 Lawên Rama û Geba,
şeş sed û bîst û yek. 27 Zilamên
Mîkmas, sed û bîst û dudo. 28 Zi-
lamên Beytel û Ayê, du sed û bîst û
sê. 29 Lawên Nebo, pênce û dudo.
30 Lawên Magbîş, sed û pênce û şeş.
31 Lawên Elam ên wekî din, hezar
û du sed û pênce û çar. 32 Lawên
Harîm sê sed û bîst. 33 Lawên Lod,
Hadîd û Ono, heft sed û bîst û pênc.
34 Lawên Erîha, sê sed û çel û pênc.
35 Lawên Senaa, sê hezar û şeş
sed û sîh.
36 Kahînan: Ji mala Yêşûa lawên
Yedaya, neh sed û heftê û sisê.
37 Lawên Îmmer, hezar û pênce
û dudo. 38 Lawên Paşhûr, hezar
û du sed û çel û heft. 39 Lawên
Harîm, hezar û hivdeh.
40 Lêwiyiyan: Ji lawên Hodavya,
lawên Yêşûa û Kadmîel, heftê û
çar. 41 Qesîdevanan: Lawên Asaf
sed û bîst û heyşt. 42 Lawên der-
gevanan: Lawên Şallûm, lawên
Ater, lawên Talmon, lawên Ak-
kûb, lawên Hatîta, lawên Şobay,
gişt sed û sîh û neh.
43 Netînîm[1]: Lawên Tsîha, lawên
Hasûfa, lawên Tabbaot, 44 lawên
Keros, lawên Sîaha, lawên Padon,
45 lawên Lebana, lawên Hagaba,
lawên Akkûb, 46 lawên Hagab,
lawên Şamlay, lawên Hanan,
47 lawên Gîddel, lawên Gahar,
lawên Reaya, 48 lawên Retsîn,
lawên Nekoda, lawên Gazzam,
49 lawên Ûzza, lawên Paseah,
lawên Besay, 50 lawên Asna,
lawên Meûnîm, lawên Nefîsîm,
51 lawên Bakbûk, lawên Hakûfa,
lawên Harhûr, 52 lawên Bats-
lût, lawên Mehîda, lawên Harşa,
53 lawên Barkos, lawên Sîsera,
lawên Temah, 54 lawên Netsîah,
lawên Hatîfa.
55 Lawên qûlên Silêman: Lawên
Sotay, lawên Hassoferat, lawên
Perûda, 56 lawên Yaala, lawên
Darkon, lawên Gîddel, 57 lawên
Şefatya, lawên Hattîl, lawên Po-
keret-Hetsebaîm, lawên Amî.
58 Hemûya Netînîm û lawên qûlên
Silêman, sê sed û nod û dudo.
59 Yên ku ji Tel-Melahê, ji Tel-
Harşayê, ji Kerûbê, ji Addanê û ji
Îmmerê derketine, lê yên malên
bapîrên xwe, nifşeyên xwe û ji
Îsraêl bûyîna xwe nedane xuyanî
kirin vana ne: 60 Lawên Delaya,
lawên Tobiya, lawên Nekoda, şeş
sed û pênce û dudo. 61 Û ji lawên
kahînan: Lawên Habaya, lawên
Hakkots, lawên Barzîlay ên ku
ji qîzên Barzîlayê Gîleadî ji xwe
re bi jinitî stendine û li gor navên
wan hatine bang kirin. 62 Vana
di nava yên ku bi regeza xwe tên
hesibandin li qeyda xwe geriyan,
lê belê nehat dîtin û mindar hatin
hesibandin û ji kahîntiyê hatin

[1] Karmendên perestgehê.

derketin. 63 Û walî, heta ku tevî
Ûrîm û Tûmmîm kahînek derke-
ve, bona ji tiştên herî pîroz ne-
xwin emir da wan.
64 Xeynî heft hezar û sê sed û sîh
û heft dîl û cariye, 65 hemûya ci-
vakê, bi tûmî, çel û du hezar û sê
sed û şêst kes bûn û bi jin û mêrî,
du sed qesîdevanên vana hebûn.
66 Hespên wan heft sed û sîh û
şeş; qantirên wan du sed û çel û
pênc; 67 deveyên wan çar sed û
sîh û pênc; kerên wan şeş hezar û
heft sed û bîst bûn.
68 Û dema hatin mala XUDAN
ya ku li Orşelîmê ye, hinekên ji
serokên malên bapîran, bona mala
Xwedê, bona ku wê li cîhê wê ava
bikin, pêşkêşiyên ji dil dan; 69 ji
xezîneya kar re, li gor qudretên
xwe, şêst û yek hezar darîk[1] zêr û
pênc hezar mina[2] zîv û sed qutikê
kahînan dan.
70 Bi vî awayî kahînan û Lêwiyi-
yan û hinekên ji netewê û qesîde-
vanan û dergevanan û Netînîm di
bajarên xwe de, hemûya Îsraêlê jî
di bajarên xwe de rûniştin.

*Pêşkêşgeh dîsa tête avakirinê*

5.Mûs 12.11-14

3 Û lawên Îsraêl, hîn li bajaran
bûn, dema meha heftemîn
gîhaşt, netewe wekî yek zila-
mek be, li Orşelîmê civiyan. 2 Û
Yêşûayê lawê Yotsadak û Zerûb-
babelê lawê Şealtîel û birayên
wî rabûn û li gor ku di zagona
zilamê Xwedê Mûsa de nivîsan-
diye, bona ku li ser pêşkêşiyên
şewitandinê pêşkêş bikin, pêş-
kêşiya Xwedayê Îsraêlê çêkirin.
3 Û pêşkêşîgehê li cîhê wê ava
kirin; ji ber ku, ji ber netewên
welatan li ser wan tirs hebû û li
ser wê ji XUDAN re pêşkêşiyên
şewitandinê, pêşkêşiyên ku si-
behê û êvarê tên pêşkêşî kirin
pêşkêş kirin. 4 Û li gor ku nivî-
sandiye cejna haymeyan çêkirin
û li gor ûsilê roj bi rojê, bi hej-
marê pêşkêşiyên şewitandinê 5 û
paşî wê pêşkêşiya şewitandinê ya
ku her timî ye û pêşkêşiyên serê
mehan û hemû cejnên XUDAN
yên pîroz, ên ku hatine eşkere
kirin û pêşkêşiya ji dil ya ku her
kes bi dil pêşkêşî XUDAN dikin
pêşkêş kirin. 6 Di roja yekem ya
meha heftan de dest bi pêşkêşî
kirina pêşkêşiyên şewitandinê
ji XUDAN re kirin; lê belê hîn
bingeha Perestgeha XUDAN ne-
hatibû avêtin. 7 Û zîv dan ava-
kir û xeratan û li gor destûra ku
ji Koreşê qiralê Farsê stendiye,
ji Lubnanê berbi behrê, bona ku
darê erzê bînin Yafayê, xwarin û
vexwarin û zeytê dan Saydayî û
Sûriyan.

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Li rasteka menan binêrin.

*Bingehên Perestgeha Duwemîn têne avêtin*

8 Û di sala duwemîn ya hatina
wanî mala Xwedê, Orşelîmê de,
di meha duwem de Zerûbbabelê
lawê Şealtîel û Yêşûayê lawê
Yotsadak û birayên wan, ji ber
mayiyên kahînan û Lêwiyiyan
û hemûyên ku bi sirgûnî hatine
Orşelîmê dest bi kar kirin û bona
ku karên mala XUDAN pêş ve bi-
bin Lêwiyiyan dan wezîfedarkirin.
9 Û Yêşûa û lawên wî û birayên
wî, Kadmîel û lawên wî, lawên
Cihûda, wekî pev re bin, lawên
Henadad û lawên wî û Lêwiyiyên
ku birayên wan e jî, li ser yên ku
di mala Xwedê de kar dikin se-
kinîn. 10 Û dema çêkiran bingeha
Perestgeha XUDAN danîn, bona
ku şikiryê ji XUDAN re bikin, li
gor tertîba qiralê Îsraêlê Dawid,
kahînên wan kinc li xwe kirî bi
boriyan û Lêwiyiyên lawên Asaf
bi zîlan sekinîn. 11 Û bi gotina:
Ji ber ku qenc e, ji ber ku xêra
wî li ser Îsraêlê abadîn e hemd û
şikiryê ji XUDAN re kirin û rû-
birû sekinîn û sitirandin. Û dema
wan hemdê ji XUDAN re dikirin,
hemûya netewê bi qêrîneki mezin
qêriyan, ji ber ku bingeha mala
XUDAN hatibû danîn. 12 Lê belê
ji kahîn û Lêwiyiyan û ji serokên
mala bapîran gellekan, zilamên
kalepîr ên ku mala pêşîn ditîne,
dema dîtin ku li ber çavên wan
bingeha vî xaniyî hate danîn, bi
dengekî bilind giriyan û gellekan
bi dengekî bilind, bi kêfxweşiyê
qêriyan 13 û netewe şemateya
qêrîna kêfxweşiyê, ji dengê giri-
ya netewê cuda nekirin; ji ber ku
netewe bi dengê bilind qêriya û
şematê ji dûr ve hate bihîstin.

*Neyar li dijî avakirina Perestgehê disekinin*

4 Û dema neyarên Cihûda û
Benyamînê, bi gotina: Lawên
wê yên sirgûn bona Xwedayê Îs-
raêlê XUDAN Perestgehê çêdi-
kin bihîstin, 2 nêzîkî Zerûbbabel
û serokên malên bapîran bûn û ji
wan re gotin: Em jî tevî we ava
bikin; ji ber ku em jî mîna we li
Xwedayê we digerin û ji rojên ku
qiralê Asûrê Esar-Haddonê ku me
derxistiye vir em ji wî re qurbanê
serjê dikin. 3 Lê belê Zerûbbabel
û Yêşûa û yên ku ji ber serokên
malên bapîran mane ji wan re go-
tin: Di ava kirina mala Xwedayê
me de tu karê ku hûn bi me re
bikin nîne; lê mîna qiral Koreşê
qiralê Farsê emir daye me, em ê bi
yek destî ji Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN re çêbikin! 4 Wê gavê ne-
tewa welêt, destê netewa Cihûda
sist kirin û dema ava dikirin ten-
gasiyê dan wan 5 û bona ku meq-
sedên wan vala derxînin, di hemû
rojên qiralê Farsê Koreşê de, heta
qiraletiya qiralê Farsê Daryûs, li

dijî wan, bi mûçe şîretkeran girtin.
6 Û di qiraletiya Ahaşveroş de, di
destpêka qiraletiya wî de li dijî yên
ku li Cihûdayê û Orşelîmê rûdinin
nivîsek sûcdar dike, nivîsandin.
7 Û di rojên Artahşaşta de, Bîşlam,
Mîtredat, Tabeel û yên ku ji ber he-
valên wan mayîne, ji qiralê Farsê
Artahşaşta re nivîsandin û nivîsa
nameyê bi tîpên Aramî ve hate ni-
vîsandin û bi zimanê Aramiyê ve
hate wergerandin. 8 Walî Rehûm
û katib Şîmşay ji qiral Artahşaşta
re, li dijî Orşelîmê nameyekî
wusa nivîsandin; 9 wê gavê walî
Rehûm û katib Şîmşay û yên ku
ji ber hevalên wan mayîne, Din-
aiyan û Afarsatkiyan, Tarpeyiyan,
Afarsiyan, Arkeviyan, Babîliyan,
Şûşankiyan, Dehaiyan, Elamiyan
10 û ji ber mayiyên neteweyên ku
Osnapparê mezin û bi nav û deng
wan ajotine û li bajarên Samîriyê
û li cîhên ku aliyê dinî çem (Fe-
ratê) mayîne dane rûniştandin re,
nivîsandin û her wekî din.
11 Sûreta nameya ku ji qiral
Artahşaşta re şandine ev e: Qûlên
te, zilamên ku li wî aliyê çem[1] in û
her wekî din. 12 Bila qiral bizani-
be ku, Cihûdên ji cem te derketin,
hatin Orşelîmê cem me û vî bajarê
asê û xerab ava dikin û dîwaran
qedandin û bingehan cebirandin.
13 Niha bila qiral bizanibe ku, ger
ev bajar were ava kirin û dîwar
bên qedandin, dê xerc, bacgeh û
perê ling danînê[2] nedin û dê da-
wiyê bona qiralan bi zerar bin.
14 Niha, madem ku em xwêya
qesrê dixwin û dîtina ku xesar ji
qiral re bibe ji me re nabe[3], ji ber
vê yekê me ji qiral re şandin û jê
re gîhandin 15 ku, bila di pirtûka
dîrokê ya bapîrên xwe de lêkolîn
were kirin û tuyê di pirtûka dîrokê
de bibîne û fêhm bike ku, ev bajar
asê û bajarekî ji qiral û welatan re
bi zirar e û wan, di demên berê de
di hundirê wê de xayîntiyê kirin;
ji ber vê yekê ew bajar hate xera
kirin. 16 Em ji qiral re têdighînin
ku, ger ev bajar bête ava kirin û
dîwar werin qedandin, ji ber vê
yekê di aliyê dinî çem de dê para
te nemîne.
17 Qiral ji walî Rehûm û katib
Şîmşay re û ji bermayiyên hevalên
wan ên ku li Samîriyê û aliyê dinî
çem rûdinin re bersivê şand: Silav
û her wekî din! 18 Nameya ku
we ji me re şandin, li ber min bi
eşkereyî hate xwendin. 19 Û emir
dam û lêkolîn hate kirin û hate
dîtin ku, ev bajar ji berê ve li dijî
qiralan serî hildida û di hundirê
wê de asêtî û xayîntî dihat kirin.
20 Û li ser Orşelîmê qiralên dijwar

1 Ferat.
2 Pê lêxistinê.
3 Li me nayê.

hebûn û li aliyê dinî çem, li ser
hemûya warê serweriyê dajotin
û xerc, bacgeh û perê ling danînê
didan wan. 21 Niha emir bidin ku
bila ev zilaman bisekinin û heta ku
ez emir bidim bila ew bajar neyê
ava kirin. 22 Û di vê de xwe ji sistî
kirinê biparêzin; ma çima dê ji xe-
sara qiralan re zirar zêde bibe?
23 Wê gavê dema sûreta nameya
qiral Artahşaş li ber Rehûm û ka-
tib Şîmşay û hevalên wan ve hate
xwendin, bi lezî çûn Orşelîmê, cem
Cihûdiyan û bi zordestî û quwetê
wan sekinandin. 24 Li Orşelîmê,
karê mala Xwedê wê gavê sekinî
û heta du saliya qiraletiya Daryûsê
qiralê Farsê sekinî.

*Perestgeh dîsa tê avakirin*
Hag 1,1-2.19; Zek 1-8

5 Û peyxamberan, peyxam-
ber Hagay û Zekaryayê lawê
Îddo, ji Cihûdiyên ku li Cihûdayê
û Orşelîmê ne re peyxambertiyê
kirin; bi navê Xwedayê Îsraêlê
ve peyxambertiyê ji wan re ki-
rin. 2 Wê gavê Zerûbbabelê lawê
Şealtîel û Yêşûayê lawê Yotsadak
rabûn û dest bi ava kirina mala
Xwedê ya ku li Orşelîmê ye kirin
û peyxamberên Xwedê yê ku alî-
kariyê bi wan re dikin, tevî wan
bûn. 3 Di wê demê de Tattenayê
ku waliyê aliyê dinî çem e û Şetar-
Bozenay û hevalên wan hatin cem
wan û ji wan re wusa gotin: Ma
bona ava kirina vî xaniyî û bona
qedandina dîwar kî emir da we?
4 Wê gavê, bi vî awayî, navê yê
ku vê xaniyê ava dikin ka çi ne,
me ji wan re gotin. 5 Û çavê Xwe-
dayê Cihûda, li ser kalepîrên wan
bû û heta ku ev kar gîhaşt Daryûs
û heta ku di derheqê vê yekê de bi
nameyê bersiv vegeriya jî Cihûdi-
yan nedan sekinandin.
6 Sûreta nameya ku waliyê aliyê
dinî çem Tattenay û Şetar-Bozenay
û hevalên wan Afarsakiyên ku li
aliyê dinî çem in, ji qiral Daryûs re
şandine ev e; 7 jê re name şandin û
di hundirê wê de wusa nivîsandî bû:
Bila ji qiral Daryûs re aştiyek bitûm
be! 8 Bila qiral bizanibe ku, em çûn
welatê Cihûdayê, mala Xwedayê
mezin, ew ji kevirên mezin ve ha-
tiye ava kirin û beştan xistine hun-
dirê dîwarên wê û ev kar bi xîretê
ve tête kirin û di destên wan de qenc
derbas dibe. 9 Wê gavê me ji wan
kalepîran ve pirsiyan û ji wan re
wusa gotin: Ma bona ava kirina vî
xaniyî û bona qedandina vî dîwarî
kî emir da we? 10 Him jî bona na-
vên zilamên li serê wan in bighînin
te, ji bo binivîsînin, me navên wan
pirsîn. 11 Û bi vî awayî bersivê dan
me û gotin: Em qûlên Xwedayê erd
û ezmanê ye ne û vî xaniyê ku gel-
lek salên berî niha hatiye ava kirin
çê dikin, qiralê Îsraêlê yê mezin
wê çêkir û qedand. 12 Lê belê paşî
ku bapîrên me Xwedayê ezmanan

hêrs kirin, wan da destên Nebûkad-
netsarê qiralê Babîlê, ew vî xaniyî
xera kir û netewê bi Babîlê ve ajot.
13 Lê belê di sala yekemîn ya qi-
ralê Babîlê Koreş de, qiral Koreş,
bona ku ev mala Xwedê were ava
kirin emir da. 14 Him jî qiral Koreş,
feraxên zêr û zîv ên mala Xwedê
yên ku Nebûkadnetsar wan ji Pe-
restgeha ku li Orşelîmê ye derxis-
tine û birine perestgeha Babîlê, ji
perestgeha Babîlê derxistin û ew ji
zilamê ku navê wî Şeşbatsar e û wî
ew kiriye walî re hatin dayîn. 15 Û
jê re got: Van feraxan rahêle û here,
wan deyne hundirê Perestgeha ku li
Orşelîmê ye û bila mala Xwedê di
cîhê xwe de bête ava kirin! 16 Wê
gavê Şeşbatsar hat û bingehên mala
Xwedê ya ku li Orşelîmê ye danîn û
ji wê gavê, heta niha tête ava kirin
û hîn neqediyaye. 17 Û niha, ger ji
qiral re qenc bête xuya kirin, bona
ku li Orşelîmê vê mala Xwedê bête
ava kirin gelo emir daye an jî ne-
daye, bila li cem qiral, di mala xezî-
neyan ya ku li Babîlê ye de lêkolîn
bête kirin û bila qiral xwesteka xwe
yî di derheqê vî karî de ji me re bi-
gihîne.

*Daryûs Emir dide*

Zek 4,9; 7,1-8,23

6 Wê gavê qiral Daryûs emir
da û di mala pirtûkan ya ku
xezîneyan tê de veşartine de û li
Babîlê ye, lêkolîn hate kirin. 2 Û
li Akmetayê, li qesra ku li welatê
Medan e tomarek hate dîtin û di
hundirê wê de darbestek wusa ha-
tibû nivîsandin: 3 Di sala yekan
ya qiral Koreş de, qiral Koreş
emir da: Li Orşelîmê di derheqê
mala Xwedê de ye: Ev xanî, ev
cîhê ku qurban lê tê pêşkêş kirin,
bila bête ava kirin û bila bingehên
wê bi zexmî bête ava kirin; 4 sê
rêz kevirên mezin, wekî rêzek
beştên nû bin, bila bilindahiya wê
şêst gez û firehiya wê şêst gez[1]
bin û bila mesrefa wê ji mala qi-
ral ve bête dayîn. 5 Him jî feraxên
zîv û zêr yên mala Xwedê, ên ku
Nebûkadnetsar wan ji Perestgeha
li Orşelîmê ye derxistiye û aniye
Babîlê şunda bên dayîn û bila
wan bibin Perestgeha li Orşelîmê,
her yekê bibin cîhên wan û tuyê
wan têxe mala Xwedê.
6 Niha waliyê aliyê dinî çem Tat-
tenay û Şetar-Bozenay û hevalên
wan û Afarsakiyên ku li aliyê
dinî çem in, ji wir bi dûr bikevin!
7 Karê vê mala Xwedê berdin;
bila waliyê Cihûdan û kalepîrên
Cihûdan vê mala Xwedê li cîhê
wê ava bikin. 8 Û bona ava kirina
vî xaniyê Xwedê ez emir didim
we ku, ka hûn ê ji kalepîrên Cihû-
da re çi bikin: Bona ku ji karên
xwe ve neyên stendin, bila mes-
refa van zilaman ji malê qiral ve,

1 Li rasteka menan binêrin.

ji xerca aliyê dinî çem hema bidin wan. 9 Divê bona pêşkêşiyên ku ji Xwedayê ezmanan re tên şewitandin ganêrên ciwan û beranan û berxikan; divê li gor gotina kahînên ku li Orşelîmê ne genim, xwê, xemr û rûn, ger motajî çi bin, bila roj bi roj bê kêmasî ji wan re bide dayîn; 10 da ku, bila qurbanên bêhn xweş ji Xwedayê ezmanan re pêşkêş bikin û bila ji tenduristiya qiral û lawên wî re dua bikin. 11 Û emir didim ku, bila ji mala her zilamê ku vê gotina duguherin sitûnek bê derxistin û bila bi ser wê ve bête rakirin û daliqandin û ji ber vê yekê bila mala wî bikin zibilxane 12 û bila Xwedayê ku wê derê ji navê xwe re kiriye şunwar, hemû netewe û qiralên bona vê mala Xwedê ya li Orşelîmê ye xera bikin vê gotina buguherin, destê xwe dirêj dikin têk bibin! Ez Daryûs, emir dam; bila hema bête çêkirin!

*Nezîrkirina Perestgehê*

13 Wê gavê waliyê aliyê dinî çem Tattenay, Şetar-Bozenay û hevalên wan, ji ber ku qiral Daryûs şandiye, hema li gor wê kirin. 14 Û kalepîrên Cihûda ava kirin û bi peyxambertiya peyxamber Hagay û Zekaryayê lawê Îddo karên wan qenc derbas bûn. Û Îsraêl, li gor emrê Xwedê û li gor emrê Koreş û Daryûs û qiralê Farsê Artahşaşta kirin û qedandin. 15 Û ev xanî di sala şeşemîn ya qiraletiya Daryûs de, di roja sêwem ya meha Adarê de hate qedandin.
16 Û lawên Îsraêl, kahînan û Lêwiyiyan û yên ku ji ber lawên sirgûnê ve mayîne, pîroz kirina vê mala Xwedê bi kêfxweşiyê ve çêkirin. 17 Û bona pîroziya vê mala Xwedê sed ganêr, du sed beran, çar sed berxik û bona hemûya Îsraêlê li gor hejmara nîjadên Îsraêlê, wekî qurbana sûcê donzdeh nêrî pêşkêş kirin. 18 Û bona xizmeta Xwedê ya li Orşelîmê ye, li gor ku di pirtûka Mûsa de nivîsandiye, kahînan danîn liqên wan û Lêwiyiyan xistin taximên wan.

*Cejna Fisihê tête Pîroz kirin*

19 Û lawên sirgûnê, Fisihê di roja çardeha meha yekemîn de çêkirin. 20 Ji ber ku kahînan û Lêwiyiyan xwe, wekî zilamekî bin paqij kiribûn: ew gişt paqij bûn û bona giştikên lawên sirgûnê û bona birayên wan kahînan û bona xwe, qurbanê Fisihê serjê kirin. 21 Û lawên Îsraêlê ên ku ji sirgûnê hatine û giştikên ku bona li Xwedayê Îsraêlê XUDAN ve bigerin xwe ji mindariya netewê welat ve bona wan cihê kirine, xwarin 22 û bi kêfxweşiyê heft rojî cejna nanê bêhavên çêkirin: ji ber ku XUDAN wan kêfxweş kiribû û Xwedayê Îsraêlê, bona di karê

mala Xwedê de destên wan xwurt
bikin, dilê qiralê Asûrê berbi wan
ve vergerandibû[1].

*Esra tête Orşelîmê*

7 Û paşî van karan, dema qiralê
Farsan Artahşaşta qiraleti-
yê dikir, Esrayê lawê Serayayê,
lawê Azaryayê, lawê Hîlkiyayê,
2 lawê Şallûmê, lawê Tsadokê,
lawê Ahîtûbê, 3 lawê Amaryayê,
lawê Azaryayê, lawê Merayotê,
lawê Zerahyayê, 4 lawê Ûzziyê,
lawê Bûkkiyê, 5 lawê Abîşûayê,
lawê Fînehasê, lawê Eleazarê,
lawê Serokkahîn Harûn –, 6 ev
Esra ji Babîlê derket. Û di zago-
na Mûsa ya ku Xwedayê Îsraêlê
XUDAN dayiye de, nivîskarek
zanyar bû û ji ber ku destê Xwe-
dayê wî XUDAN li ser wî bû, qi-
ral her xwesteka wî da wî. 7 Û di
sala heftemîn ya qiral Artahşaşta
de, ji lawên Îsraêlê û ji kahînan û
ji Lêwiyiyan û ji qesîdevanan û ji
dergevanan û ji Netînîmê hinek
kes derketin Orşelîmê. 8 Û Esra di
sala heftemîn ya qiral de, di meha
pêncemîn de hate Orşelîmê. 9 Ji
ber ku di roja yekemîn ya meha
yekem de dest bi ji Babîlê derke-
tinê kir û ji ber ku destê Xwedê ya
xêrê li ser wî bû, di roja yekem ya
meha pêncan de gîhaşt Orşelîmê.
10 Ji ber, bona ku li zagona XU-
DAN bigere û bike û bona ku li
Îsraêlê zagon û daraziyan bide
hîn kirin, Esra dilê xwe amade
kiribû.

*Nameya ku Qiral Artahşaşta dide Esra*

11 Û sûreta nameya ku qiral
Artahşaşta daye Esrayê kahîn, ni-
vîskar û nivîskarê gotinê zagonên
ku li Îsraêlê ne, ev e: 12 Ji qiralê
qiralan Artahşaşta ve, ji kahîn, ni-
vîskarê zagona Xwedayê ezmanan
Esra re bila bi tûmî silav be! 13 Ez
emir dikim ku, hemûyên ji nete-
wa Îsraêlê û ji kahînên wê ve û ji
Lêwiyiyan, yên ku bi dil dixwazin
ku herin Orşelîmê bila bi te re he-
rin. 14 Madem ku tu, li gor zagona
Xwedê ya ku di destê te de yî, lê-
kolînê di derheqê Orşelîmê û Cihû-
dayê de 15 û zêr û zîvê ku qiral û
şîretkir ji dil dayîne Xwedayê Îs-
raêlê, ê ku şunwara wî li Orşelîmê
ye 16 û tevî pêşkêşiyên ji dil ên ku
bona mala Xwedayê Îsraêlê ya ku li
Orşelîmê ye netewe û kahînan ji dil
dayîne, bona ku hemû zêr û zîvên
tuyê li welatê Babîlê bibîne, bibe,
tu ji aliyê qiral û heft şîretkirê wî ve
tête şandin; 17 ji ber vê yekê, bi vî
zîvî, tuyê hema ganêran, beranan,
berxikan û pêşkêşiyên wanî nan û
pêşkêşiyên şewitandinê bistîne û
tuyê wan li ser pêşkêşîgeha mala
Xwedayê we ya ku li Orşelîmê ye,
pêşkêş bike. 18 Û ji te û ji birayên
te re, yên ku ji ber zêr û zîv mayîne

1 Zivirandibû.

çawa xerc kirin qenc bête xuyanî
kirin, li gor mirazê Xwedayê xwe
wê bikin! 19 Û hemû taximên ku
bona xizmeta mala Xwedayê te ji
te re hatine dayîn, li ber Xwedayê
Orşelîmê bide. 20 Û bi zêdeyî her
çiyê ku bona mala Xwedê hewce
dike û dayina wê bi te dikeve hebe,
wê ji mala xezîneya qiral ve bide.
21 Û ez, qiral Artahşaşta, ji hemû
xeznedarê li aliyê dinî çem in re
emir didim ku, nivîskarê zagona
Xwedayê ezmanan, kahîn Esra, 22
ji zîv heta sed talantî[1] û ji genim heta
sed olçegî[2] û ji xemrê heta sed batî[3]
û ji rûn ve heta sed batî û ji xwê ve
wekî li hisêb neyê nivîsandin, her çi
ji we bixwazî, bila hema bête kirin.
23 Bona mala Xwedayê ezmanan,
ji aliyê Xwedayê ezmanan ve her çi
bête emir dayîn, bila li cîh ve bête
çêkirin; ji ber ku ma dê çima hêrs
were ser welatê qiral û lawên wî?
24 Û em ji we re dighînin ku, dema
em werin hemû kahînan û Lêwi-
yiyan, qesîdevanan, dergevanan,
Netînîm û xizmetkarên mala Xwe-
dê, ji bona ku ji wan re danîna xerc,
bacgeh û perê pêl danînê destûr
nîne. 25 Û tu Esra, li gor hîkmeta
Xwedê ya ku di destê te de yî, serek
û serweran deyne, da ku, ji hemû
netewa ku li aliyê dinî çem e, bila
ji hemûyên ku bi zagona Xwedayê
te dizanin ve serweriyê bikin û hînî
yê nezan bikin. 26 Û her kiyê ku
bi zagona Xwedayê te û bi emirên
qiral ve meke, dixwaze bila bona
mirinê, dixwaze sirgûnê, dixwaze
talankirina mala wî û dixwaze jî
bona girtinê bila hema darazî li ser
wî bêtè kirin.

### *Esra Pesnê Xwedê dide*

27 Bila Xwedayê kalikên me
XUDAN pîroz bibe ku, bona
mala XUDAN ya li Orşelîmê
ye, xweşik kirinê, tiştekî wusa
xist dilê qiral 28 û li ber qiral û
şîretkirên wî û hemû serekên egîd
yên qiral, xêrê bi ser min ve ber-
da. Û ez, ji ber destê XUDAN
Xwedayê min, ê ku li ser min e
quwetê dîtim û bona ku bi min re
derkevin, ji Îsraêlê zilamên serî
civandim.

### *Lîsteya Kesên ku bi Esra re vegeriyane Orşelîmê*

8 Û serokên mala bapîran vana
ne û di dema qiraletiya qiral
Artahşaşta de navnîşa yên ku tevî
min ji Babîlê derketine ev e: 2 Ji
lawên Fînehas Gerşom, ji lawên
Îtamar Danîêl. Ji lawên Dawid
Hattûş. 3 Ji lawên Şekanya, ji
lawên Paroş Zekarya û tevî wî
sed û pêncî mêrên ku bi regezê ve

[1] Li rasteka menan binêrin.
[2] Li rasteka menan binêrin.
[3] Li rasteka menan binêrin.

tên hesibandin. 4 Ji lawên Pahat-
Moab Elyehoenayê lawê Zerahya
û tevî wî du sed mêr. 5 Lawê
Yahazîelê ku ji lawên Şekanya ye
û tevî wî sê sed mêr. 6 Û Ebedê
lawê Yonatanê ku ji lawên Adîn e
û tevî wî pênce mêr. 7 Û ji lawên
Elam ve, Yeşayayê lawê Atalya
û tevî wî heftê mêr. 8 Û ji lawên
Şefatya, Zebadyayê lawê Mîkael
û tevî wî heyştê mêr. 9 Ji lawên
Yoab ve Obadyayê lawê Yehîel
û tevî wî du sed û hîjdeh mêr.
10 Û ji lawên Şelomît, lawê
Yosîfya û tevî wî sed û şêst mêr.
11 Û ji lawên Bebay ve, Zekar-
yayê lawê Bebay û tevî wî bîst
û heyşt mêr. 12 Û ji lawên Az-
gad ve Yohananê lawê Hakkata
û tevî wî sed û deh mêr. 13 Û ji
lawên dawîn yên Adonîkam û na-
vên wan ev in: Elîfelet, Yeûel û
Şemaya û tevî wan şêst mêr. 14 Û
ji lawên Bîgvay, Ûtay û Zabbûd û
tevî wan heftê mêr.

*Vegera Orşelîmê*

15 Û wan li cem çemê ku berbi
Ahavayê diherike civandim û me
li wê derê sê roj qonaxê danî û ne-
tewe û kahînan ji ber çav ve der-
bas kirim; lê belê li wir, ji lawên
Lêwiyiyan ve tu kesî nedîtim.
16 Û bangî zilamên wanî serî;
Elîezer, Arîel, Şemaya û Elnatan
û Yarîb û Elnatan û Natan û Ze-
karya û Meşûllam û bangî zilamên
fêhmkar, Yoyarîb û Elnatan kirim.
17 Û wan şandim cem Îddoyê ku
li cîhê navê wê Kasîfya ye serî yî
û bona ji me re, ji bo xizmeta mala
Xwedayê me zilaman bînin, li cîhê
ku navê wê Kasîfya ye ji Îddo û ji
birayên wî re, ji Netînîmê re bi-
bêjin, gotinan xistim devên wan.
18 Û ji ber destê xêrê ya Xwedê,
ya ku li ser me ye ji me re, ji lawên
Mahliyê, lawê Lêwiyê, lawê Îs-
raêlê yî, zilamekî bi fêhmakarî û
Şerebya û lawên wî û birayên wî,
hîjdeh kes 19 û Haşabya û tevî
wî ji Yeşayayê ji lawên Merarî,
birayên wî û lawên wan, bîst kesî
20 û ji Nîtînîma Dawid û serekên
wî bona xizmeta Lêwiyiyan daye,
du sed û bîst Netînîmî anîn. Ew gişt
bi navên xwe ve hatibûn bîr anînê.
21 Û li ber Xwedayê me, bi xwe
nizm kirinê û ji wî ve bona xwe û
bona zarokên xwe û bona hemû
malên xwe ji bo ku rêya rast bi-
xwazin, li wir, li cem çemê Aha-
ya rojiyê dam bang kirin. 22 Ji
ber bona ku li dijî neyar di rê de
alîkariyê ji me re bikin, şerm diki-
rim ku ji qiral ve leşker û siwaran
bixwestima; ji ber ku, me ji qiral
re bi gotina: Bona qenciyê, destê
Xwedayê me li ser hemûyên ku lê
digerîne ye: lê belê qudret û hêrsa
wî li ser hemûyên ku dev jê berda-
ne ye, gotibûn. 23 Û me rojiyê gir-
tin û bona vê yekê lava ji Xwedayê
xwe re kirin û duaya me qebûl kir.

24 Û donzdeh kes ji serokên kahîn-
an ve, Şerebya, Haşabya û tevî wan
deh kesî ji birayên wan ve cuda ki-
rim 25 û hemû zîv û zêr û feraxan,
pêşkêşiya ku bona mala Xwedayê
me ye, yên ku qiral û şîretkirên wî û
serekên wî û hemûya Îsraêlê ya ku li
wir in pêşkêş kirine, bi weznê dam
wan; 26 şeş sed û pênce talant zîv û
sed talant feraxên zîv; sed talant zêr
27 û bîst tasê zêrîn ên ku hezar
darîkî ne û du feraxên tûncê di-
biriqe, ên qasî zêr biqîmet in bi
weznê dam destên wan. 28 Û ji
wan re gotim: Hûn ji XUDAN re
pîroz in û ev feraxan pîroz in û ev
zîv û zêr, ji Xwedayê bapîrên we
XUDAN re pêşkêşiyên ji dil in.
29 Hişyar bin û hûn wan li ber
kahînan û serekên Lêwiyiyan û
serekên malên bapîrên Îsraêlê, li
Orşelîmê, di odeyên mala XUDAN
de heta ku bi weznê bidin, vana bi-
parêzin! 30 Û heta kahînan û Lêwi-
yiyan bona ku wan bibin Orşelîmê,
mala Xwedayê me, wezna zîv û zêr
û feraxan stendin.
31 Û bona ku herin Orşelîmê di
roja donzdeh ya meha yekemîn
de me ji çemê Ahava ve koç kirin
û destê Xwedayê me li ser me bû
û me ji destê neyar, ji yê ku di rê
de kemînê avêtiye xelas kir. 32 Û
em gîhaştin Orşelîmê û li wê derê
sê roj rûniştin. 33 Û di roja çaran
de, di mala Xwedayê xwe de, zîv
û zêr û ferax, bi destê Meremotê
lawê kahîn Ûriya ve hatin wezi-
nandin – û Eleazarê lawê Fînehas
bi wî re bû û tevî wan Lêwiyiyan,
Yozabadê lawê Yêşûa û Noadya-
yê lawê Bînnûy hebûn –; 34 gişt
bi hejmarê û bi weznê hatin dayîn
û hemûya weznê wê çaxê hatin
nivîsandin.
35 Lawên sirgûnê, ên ku ji sirgûnê
ve hatine, pêşkêşiyên ku ji Xwe-
dayê Îsraêlê re hatine şewitandin,
bona hemûya Îsraêlê donzdeh ga,
nod û şeş beran, heftê û heft ber-
xik û wekî pêşkêşiya gunehê be
donzdeh nêrî pêşkêş kirin; gişt
pêşkêşiyên ku ji XUDAN re ha-
tine şewitandin bûn. 36 Û emirên
qiral, dan wekîlên qiral û waliyên
aliyê dinî çem; wan jî alîkariyê bi
netewê û ji mala Xwedê re kirin.

### *Duaya Esra*

Neh 9; Dan 9

9 Dema ev tiştan hatin qedan-
din, serekan nêzîkî min hatin
û gotin: Netewa Îsraêlê û kahînan
û Lêwiyiyan, xwe ji tiştên mekrûh
ên neteweyên welatan, ên Hîtti-
yan, Perîzziyan, Yebûsiyan, Am-
moniyan, Moabiyan, Misiriyan û
Amoriyan, cihê nekirin. 2 Ji ber
ku ji xwe û lawên xwe re ji qîzên
wan ve stendin û nîjada pîroz, bi
neteweyên welatan ve tevlihev
bû û destê serek û serweran di vê
xayîntiyê de, di serî de bûn. 3 Û
dema min bi xwe vî tiştî bihîst,

kinc û qeftanê xwe çirandim, porê
serê xwe û rîha xwe lîçikandim û
bi şaş û metalî rûniştim. 4 Û ji ber
xayîntiya sirgûnan hemûyên ku ji
ber gotinên Xwedayê Îsraêlê ve
dilerizin li cem min civiyan û ez
heta pêşkêşiya êvarê bi şaş û me-
talî rûniştim.
5 Û di dema pêşkêşiya êvarê de
bi kinc û qeftanê xwe yî çiriyayî,
ji xwe nizm kirinê rabûm û bi ser
çongên xwe ve ketim û destên
xwe ji Xwedayê xwe XUDAN re
vekirim 6 û gotim: Ya Xwedayê
min, ez şerm dikim û fedî dikim
ku wecê xwe ji te re, ji Xwedayê
xwe re rakim; ji ber ku fesadiyên
me ji serên me zêdetir bûn û gu-
nehên me mezin bû û gîhaştin
ezmanan. 7 Ji rojên bapîrên me,
heta îroj em di hundirê gunehekî
mezin de ne û mîna ku îroj wusa
ye, em, qiralên me, kahînên me, ji
ber fesadiya me, em bi destê qi-
ralên welatan ve, ji şûr, sirgûnê,
talanê û rûreşiyê re hatin dayîn.
8 Û bona ku bazdin û birevin yên
li pêy me mayîne bên berdan û
bona ku Xwedayê me çavên me
ronî bike, li cîhê xwe yî pîroz de
şunwarê[1] bide û bona ku di hun-
dirê dîlitiya me de hinekî zindiyî
bide me, niha ji aliyê Xwedayê
me XUDAN ve demek xêr ji me
re hate xuyanî kirin. 9 Ji ber ku
em dîl in; lê belê Xwedayê me,
me di dîlitiyê de nehişt; lê belê
bona ku em mala Xwedayê xwe
damezirînin û xerabeyên wî ava
bikin zindiyî bidî me û bona ku li
Cihûdayê û li Orşelîmê dîwarekî
bidî me, li ber qiralên Farsê xêrê
bi ser me ve berda.
10 Û niha, ya Xwedayê me, em
paşî vêya çi bibêjin? Ji ber ku me
dev ji emirên te berdan, 11 te bi
navdîtiya qûlên xwe yî peyxam-
ber emir da û got: Welatê ku bona
hûn bibin xwedî milk hûn diçinê,
bi tiştên mekrûh ên ku mindarî û
pîsitiya ku neteweyên welatan wê
bi serbiser dagirtine ve gemarî ne
12 û niha qîzên xwe nedin lawên
wan û qîzên wan ji lawên xwe re
nestînin û qet li xweşî û qenciya
wan negerin ku, hûn quwetê bi-
bînin û tiştê qenc ên welêt bixwin
û wê bi abadînî ji lawên xwe re
weke mêrasî bihêlin.
13 Û paşî her tiştên ku ji ber karên
me yî xerab û ji ber gunehên me yî
mezin hatine serê me, tu, ya Xwe-
dayê me, ji ber ku te me ji liyaqiya
fesadên me kêmtir bi ceza kiriye
û wekî yên wusa direvin û xelas
dibin berdaye, 14 ma qey em dîsa
emirên te xera bikin û bi netewe-
yên ku van tiştên mekrûh kirine
ve merivtiyê bikin? Ma tuyê, heta
ku me biqedîne û heta ku yên bi-
revin û xelas bibin nemînin, li dijî
me hêrs nebûna? 15 Ya XUDAN,

[1] Di zimanê Îbranî de sing.

Xwedayê Îsraêlê, tu bi dad e; ji ber
ku mîna îro wusa ye, em wekî yên
direvin û xelas dibin hatin berdan;
a vay, em li ber te di hundirê gu-
nehên xwe de ne; ji ber vê yekê tu
kes nikare li ber te bisekine!

*Gelê Îsraêlê gunehên xwe daxuyanî dikin*

10 Û dema Esra li ber mala
Xwedê, bi girî xwe davêt
erdê û dua û mukuriyê dikir, ji Îs-
raêlê civakek mezin, zilam û pîre-
kan û zarokan li cem wî civiyan;
ji ber ku netewe bi giriyekî mezin
digiriyan. 2 Û yekî ji lawên Elam,
Şekanyayê lawê Yehîel, bersi-
vê da û ji Esra re got: Me li dijî
Xwedayê xwe xayîntiyê kirin û ji
neteweyên welêt ve jinên biyan
girtin; lê belê di vî karî de, niha
bona Îsraêlê hêvî heye. 3 Li gor
şîreta efendiyê min û yên ku ji ber
emrê Xwedê ve dilerizin, bona
berdana hemû pîrekan û yên ku ji
wan bûyîne, niha em bi Xwedayê
xwe re peymanê bibirin û bila li
gor zagonê bête kirin. 4 Rabe, ji
ber ku kar li ser te ye û em bi te re
ne; bi dil be û bike!
5 Û Esra rabû û bi kahînan, Lêwi-
yiyan û serokên hemûya Îsraêlê
bona ku li gor vê soza bikin, son-
dê da xwarin. Û sondê dan. 6 Û
Esra ji ber mala Xwedê rabû û ket
odeya Yehohananê lawê Elyaşîb
û ket wir û nan nexwar û avê
venexwar; ji ber ku ji bo xayîn-
tiya sirgûnan şînê dikişand. 7 Û
ji hemûya lawên sirgûnê ên ku li
Cihûdayê û li Orşelîmê ne, bona
ku li Orşelîmê bicivin 8 û li gor
şîreta serekan û kalepîran dê dest
bê dayîn ser hemû malên yê ku
heta sê rojî neyê û dê ew ê bi xwe
ji civaka sirgûnan ve bête derxis-
tin, hate bang kirin.
9 Û hemû zilamên Cihûdayê
û Benyamîn di hundirê sê rojî
de li Orşelîmê civiyan, di meha
nehemîn, roja bîstan de bû û
hemûya netewê, ji ber vî karî û
barînê bi lerizandin li qada ku li
ber mala Xwedê ye rûniştin. 10 Û
kahîn Esra rabû û ji wan re got: We
xayîntiyê kirin û bona ku gunehên
Îsraêlê zêde bikin jinên biyan sten-
din! 11 Û niha ji Xwedayê bapîrên
xwe XUDAN re sûcê xwe mukur
bikin, ya ku xweş e jê re bikin û ji
neteweyên welat ve û ji jinên biyan
ve cuda bibin! 12 Û hemûya civakê
bersivê dan û bi dengê bilind gotin:
Bi vî awayî, li gor gotina te kirin,
bila ji me re bibe deyn! 13 Lê belê
netewe zêde ne û wext bi barîn e
û bona me ji derve sekinandinê
teqat nîne û ev kar ne karê rojekê
an jî du rojî ye; ji ber ku me di vî
karî de gunehê zêde kirin. 14 Niha
bila bona hemûya civakê serokên
me bên wezîfedar kirin û bila bona
vî tiştî heta ku hêrsa sor ya Xwe-
dayê me ji me vegere, di demên

bijartî de, hemûyên ku di bajarên
me de jinên biyan girtine û tevî
wan kalepîr û serwerên her bajarî
bila werin. 15 Tenê Yonatanê lawê
Asahel û Yahzeyayê lawê Tîkva li
dijî vî karî sekinîn û Meşûllam û
Şabbetayê Lêwiyî alîkariyê bi wan
re kirin.
16 Û lawên sirgûnê wusa kirin.
Û kahîn Esra û hinekên ji se-
rokên malên bapîran, li gor malên
bapîran, gişt bi navê xwe ve ha-
tin hilbijartin û di meha dehemîn,
roja yekem de bona lêkolîn kirina
vî karî rûniştin. 17 Û bi hemû zi-
lamên ku jinê biyan stendine, heta
meha yekemîn, di roja yekem de
vî karî qedandin.

*Yên ku bi Jinên biyan re zewicîne*

18 Û di nava lawên kahînan de
hinekên ku jinên biyan stendine
hatin dîtin: Ji lawên Yêşûa, lawê
Yotsadak û birayên wî Maaseya û
Elîezer û Yarîb û Gedalya. 19 Û di
derheqê berdana jinên xwe de dest
dan û bi gunehkarî, bona gunehên
xwe ji keriyê beranekî pêşkêş ki-
rin. 20 Û ji lawên Îmmer: Hananî
û Zebadya. 21 Û ji lawên Harîm:
Maaseya û Eliya, Şemaya û Yehîel
û Ûzziya. 22 Û ji lawên Paşhûr:
Elyoenay, Maaseya, Simayîl, Ne-
tanel, Yozabad û Elasa.
23 Û ji Lêwiyiyan: Yozabad û
Şîmeî û Kelaya – ev Kelîta ye –,
Petahya, Cihûda û Elîezer.
24 Û ji qesîdevanan: Elyaşîb.
Û ji dergevanan: Şallûm û Telem
û Ûrî.
25 Û ji Îsraêlê; ji lawên Paroş: Ram-
ya û Îzziya û Malkiya û Miyamîn
û Eleazar û Malkiya û Benaya.
26 Û ji lawên Elam: Mattanya, Ze-
karya û Yehîel û Abdî û Yeremot û
Eliya. 27 Û ji lawên Zattû: Elyoe-
nay, Elyaşîb, Mattanya û Yeremot
û Zabad û Azîza. 28 Û ji lawên
Bebay: Yehohanan, Hananya,
Zabbay, Atlay. 29 Û ji lawên Banî:
Meşûllam, Mallûk û Adaya, Yaşûb
û Şeal, Yeremot. 30 Û ji lawên Pa-
hat-Moab: Adna û Kelal, Benaya,
Maaseya, Mattanya, Betsalel û
Bînnûy û Manaşşe. 31 Û ji lawên
Harîm: Elîezer, Îşşiya, Malkiya,
Şemaya, Şîmeyon, 32 Benyamîn,
Mallûk, Şemarya. 33 Û ji lawên
Haşûm: Mattenay, Mattatta, Zabad,
Elîfelet, Yeremay, Manaşşe, Şimeî.
34 Û ji lawên Banî: Maaday, Am-
ram û Ûel, 35 Benaya, Bedeya,
Kelûhî, 36 Vanya, Meremot,
Elyaşîb, 37 Mattanya, Mattenay û
Yaasû 38 û Banî û Bînnûy, Şîmeî
39 û Şelemya û Natan û Adaya,
40 Maknadebay, Şaşay, Şaray,
41 Azarel û Şelemya, Şemarya,
42 Şallûm, Amarya, Ûsiv. 43 Û ji
lawên Nebo: Yeîel, Mattîtya, Za-
bad, Zebîna, Îddo û Yowêl, Bena-
ya. 44 Hemûyên vana jinên biyan
stendibûn û jinên zarokên wan
çêbûne yên hinekên ji wan hebûn.

# NEHEMYA

*Pêşgotin*

Bûyerên di pirtûka Nehemya de derbas dibin, B.Z. di sedsala 5'an de derbas dibin. Di vê dewrê de gellekên Cihûdan li Babîlê di sirgûnê de bûn. Em dikarin pirtûka Nehemya bi çar bęşî cuda bikin:

1.Bona rêvebiriyê li Cihûdayê bike, qiralê Farisan Nehemya mîna waliyekî dişîne Orşelîmê
2.Selihandina sûrên Orşelîmê
3.Ji aliyê Esra, bi dengekî bilind xwendina Zagona Pîroz û mukirhatina gunehên gel.
4.Çalakiyên din yên Nehemya mîna waliyekî kirine

Yek ji xalikên di pirtûkê de derbas dibin girîng e, ew jî dilsoziya Nehemya, ya kûr ji Xwedê re û tim û tim jê re dua kirina wî ye.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:20 | Nehemya vedigere Orşelîmê |
| 3:1-7:73 | Selihandina sûrên Orşelîmê |
| 8:1-10:39 | Xwendina pirtûka Zagonê û nûkirina Peymanê |
| 11:1-13:31 | Çalakiyên din yên Nehemya |

*Duaya Nehemya*

1 Gotinên Nehemyayê lawê Hakalya.
Û wusa bû ku, di sala bîstan de, di meha Kîslevê de, hîn ez li qesra Şûşanê bûm, 2 yek ji birayên min,
Hananî, ew bi xwe û ji Cihûdayê çend zilam hatin û di derheqê Orşelîmê û Cihûdên ku ji ber sirgûnê mayîne û reviyane û xelas bûyîne de pirsîm. 3 Û ji min re
gotin: Yên ku ji ber sirgûnê mayîne li wir, li wilayetê di nava zebûniyek mezin û şermezariyê de ne: dîwarê Orşelîmê jî xera bûye û deriyên wê bi agir ve hatine şewitandin.
4 Û wusa bû ku, dema van gotinan bihîstim, rûniştim û giriyam û bi rojan ve şînê kişandim û rojiyê

girtim û li ber Xwedayê ezmanan
dua kirim û gotim: 5 Ya Xwedayê
ezmanan XUDAN, Xwedayê
mezin û birewnaq, ê bi yên ku ji
wî hez dikin û emirên wî digirin
re peyman û xêrê digire; 6 lava
dikim, gava em li sûcên lawên Îs-
raêl ên ku me li dijî te kirine mu-
kur tên, di derheqê qûlên te lawên
Îsraêl de, îroj li ber te bi şev û roj,
bona ku duaya vî qûlê te guhdarî
bike, bila guhên te bihîstkar û ça-
vên te vekirî bin! Ez û mala bavê
min, me jî sûc kirin. 7 Me li dijî te
zehf fesadiyê kirin û bi emir û za-
gon û daraziyên ku te ji qûlê xwe
Mûsa re emir dayiye negirtin. 8
Ez lava dikim; gotina ku te ji qûlê
xwe Mûsa re: Ger hûn xayîntiyê
bikin, ez ê we di nava netewan de
belav bikim; 9 lê belê ger hûn ve-
gerin aliyê min û bi emirên min
bigirin û wan bikin, yên ku ji we
hatine ajotin ger li nîçika ezma-
nan jî bin ez ê wan ji wir bidim
hev û ez ê wan bînim cîhê ku
bona navê min li wir bi cîh bibe
bijartime, emir dayiye di bîra
xwe de bîne! 10 Û ew, netewe û
qûlên te yên ku te wan bi quwet û
qudreta xwe yî mezin xelas kiriye
ne. 11 Ya Xudan, ez lava dikim,
bila guhê te ji duaya vî qûlê te û ji
duaya qûlên te yî ji navê te tirsînê
zewqê digirin re, bihîstkar be û ez
lava dikim, bila karê qûlê te îroj
qenc here û bila li ber vî zilamî
xêrê bibîne!
Û ez meygerê qiral bûm.

*Nehemya diçe Orşelîmê*

2 Û wusa bû ku, di bîst saliya
qiral Artahşaşta de, di meha
Nîsanê de, dema xemr li ber wî
bû, xemrê rakirim û dam qiral. Û
li ber wî tu carî bikeserbûna min
tune bû. 2 Û qiral ji min re got:
Çawa ku tu ne nexweş î, lê belê
çima wecê te bi keser e? Ev ne
tiştekî din e, tenê kesera dil e. Û
ez zehf tirsiyam. 3 Û ji qiral re
gotim: Bila qiral abadîn bijî! Ba-
jarê ku cîhê gorên bapîrên min in
xera bûyîne û çawa ku agir deri-
yên wê xwariye û qedandiye, dê
çawa wecê min ne bi keser be?
4 Û qiral ji min re got: Xwesteka
te çî ye? Û ji Xwedayê ezmanan
re dua kirim. 5 Û ji qiral re gotim:
Ger ji qiral re qenc bête xuyanî
kirin û ev qûlê te, ger di çavê te
de xêrê[1] dîtibim, xwesteka min
ev e ku, min bişîne Cihûdayê, ba-
jarê gorên bapîrên min ku ez wê
ava bikim. 6 Û gava ku qiralîçe
li cem wî rûniştibû, qiral ji min
re got: Dê rêwîtiya te çiqasî bi-
dome? Û tuyê çi wextî vegere? Û
şandina min ji qiral re qenc hate
xuyakirin û wexteke jê re eşkere
kirim. 7 Û ji qiral re gotim: Ger
ji qiral re qenc bête xuyanî kirin,

1 Lutif, say, qencî, an jî: Kerem.

heta ku ez bigihêjim Cihûdayê,
bona ku min derbas bikin ji bo
waliyên aliyên dinî çem[1] bila
nameyan 8 û bona deriyên birca
xanî û bona dîwarê bajêr û bona
xaniyê ku ez ê bikevimê, ji bo ku
beştan çêbikim, bo daran bidin
min, bila ji Asafê ku notirvanê
daristana qiral e re nameyek bide
dayîn. Û ji ber ku destê bi xêr yê
Xwedayê min li ser min bû, qiral
xwesteka min da min.
9 Û ez hatim waliyên aliyê dinî
çem û nameyên qiral dam wan.
Û qiral tevî min serokên artêşê û
siwaran şandibûn. 10 Û Sanbal-
latê Horonî û Tobiyayê ku dîlê
Ammonî ye, bihîstin û hatina
zilamekî, bona lêgerîna qenciya
lawên Îsraêl ji wan re bû derdê
mezin. 11 Û hatim Orşelîmê û sê
roj li wir mam. 12 Û ez şevê tevî
çend zilamên ku li cem min bûn,
rabûm û ka bona di derheqê tiştê
ku ez ê ji Orşelîmê re çê bikim
de Xwedê çi xistiye dilê min, ji
tu kesî re negotim û tenê ji hey-
wanê ku ez lê siwar bûme, li cem
min heywan tune bû. 13 Û şevê
ji Deriyê Newalê, berbi Bîra Ej-
diyar û Deriyê Sergînê derketim û
dîwarên Orşelîmê ên ku xera bûne
û deriyên wê, yên ku agir xwarine
û qedandine ji ber çavan ve der-
bas kirim. 14 Û derbasî Deriyê
Kaniyê û burka qiral bûm; lê belê
bona heywanê ku di bin min de
bû, cîhê derbasbûnê tunebû. 15 Û
şevê bi dora newalê ve derketim û
dîwar ji ber çav ve derbas kirim û
vegeriyam û ji Deriyê Newalê ve
ketimê û şunda vegeriyam. 16 Û
karmendên hukûmetê di derheqê
çûyîn û kirina min de nizanîbûn û
hîn ji Cihûdan re û ji kahînan re û
ji yên ku pêş ve tên re û ji karmen-
dên hikûmetê re û ji zilamên din
ên kar dikin re negîhadibûm.
17 Û ji wan re gotim: Hûn bêtari-
ya ku em tê de ne dibînin, Orşelîm
xerabe ye û deriyên wê bi agir
ve hatine şewitandin; werin û
em dîwarên Orşelîmê ava bikin
û êdî di hundirê şermezariyê de
nemînin! 18 Û him destê Xwe-
dayê min li ser min bi xêr e û him
jî gotinên ku qiral ji min re go-
tine, ji wan re gotim û: Ka rabin
û em ava bikin! gotin. Û bona vî
karê qenc destên xwe xwurt kirin.
19 Lê belê Sanballatê Horonî û
Tobiyayê dîlê Ammonî û Geşemê
Ereb bihîstin û qerfên xwe bi me
re kirin û me biçûk dîtin û gotin:
Ma ev kirina we çî ye? Ma hûn ê
li dijî qiral bibin asê? 20 Û ber-
sivê dam wan û ji wan re gotim:
Xwedayê ezmanan, dê ew ê karê
me qenc bike û em, qûlên wî,
em ê rabin û ava bikin, lê belê
li Orşelîmê ji we re par û maf û
bîranîn nîne!

[1] Çemê Feratê.

*Tamîrkirina Sûran*

3 Û Serokkahîn Elyaşîb û bi-
rayên wî kahînan rabûn û De-
riyê Mîhê ava kirin; wê pîroz kirin
û perîkên derî pê ve kirin û heta
qûleya Hammea, qûleya Hanaelê
wê pîroz kirin. 2 Û li cem wê zi-
lamên Erîhayê ava kirin. Û li cem
wan Zakkûrê lawê Îmrî ava kir.
3 Û lawên Senaayiyan Deriyê
Masî ava kirin; beştên wê xistinê,
perîkên derî, çilmêreyan û milên
derî pê ve kirin. 4 Li cem wan
Meremotê lawê Ûriyayê lawê
Hakkots, tamîr[1] kir. Û li cem wan
Meşûllamê lawê Berekyayê lawê
Meşezabel tamîr kir. Û li cem
wan Tsadokê lawê Baana tamîr
kir. 5 Û li cem wan Tekoayiyan
tamîr kirin, lê belê pêşhatiyên
wan histuyên xwe ji karê efendiyê
xwe re xwar nekirin.
6 Û Yoyadayê lawê Paseah û
Meşûllamê lawê Besodya Deriyê
Kevin tamîr kirin, beştên wê
xistinê, perîkên derî, çilmêreyan
û milên derî pê ve kirin. 7 Û li
cem wan Melatyayê Gîbeonî
û Yadonê Meronotî, zilamên
Gîbeon û Mîtspayê, yên ku tabihî
daraziya waliyên aliyê dinî çem
in tamîr kirin. 8 Li cem wan ji
zêrkeran Ûzzîelê lawê Harhaya
tamîr kir. Û li cem wan yek ji
etaran, Hananya tamîr kir û heta
dîwarê fireh Orşelîmê zeximand.
9 Û li cem wan serekê nêviya
dayîra Orşelîmê Refayayê lawê
Hûr tamîr kir. 10 Û li cem wan,
Yedayayê lawê Harûmaf, li
hemberî mala xwe tamîr kir. Û li
cem wî Hattûşê lawê Haşabneya
tamîr kir. 11 Malkiyayê lawê
Harîm û Haşşûbê lawê Pahat-
Moab cîhekî wekî din û qûleya
firneyan tamîr kirin. 12 Û li cem
wî serekê nêviya dayîra Orşelîmê
Şallûmê lawê Halloheş, ew bi
xwe û qîzên wî tamîr kirin.
13 Yên ku li Hanûn û Zanoahê
rûdinin Deriyê Newalê tamîr ki-
rin; wê û heta Deriyê Sergînê he-
zar gezî[2] cîh ava kirin û perîkên
derî, çilmêreyan û milên derî pê
ve kirin.
14 Û Deriyê Sergînê Malkiyayê
lawê Rekabê serekê dayîra Beyt-
Keremê ye tamîr kir û wî bi xwe wê
ava kir û perîkên derî, çilmêreyan
û milên derî pê ve kirin.
15 Û Deriyê Kaniyê Şallûnê lawê
Kol-Hozeyê serokê dayîra Mîtspa-
yê yî tamîr kir; ew bi xwe wê ava
kir û ser wê nuxumand û perîkên
derî, çilmêreyan û milên derî pê ve
kirin û li cem bexça qiral, dîwarê
burka Şelah, heta pêlikên ku ji ba-
jarê Dawid ve dadikevin ava kirin.
16 Jê wêdetir Nehemyayê lawê
Azbûkê serokê nêviya dayîra Beyt-

---

1 Selihandin.

2 Li rasteka menan binêrin.

Tsûrê, heta hemberî gorên Dawid
û heta burka çêkirî û mala egîdan
tamîr kir. 17 Jê wêdetir Rehûmê
lawê Banî, Lêwiyiyan tamîr kirin.
Li cem wê Haşabyayê serokê nê-
viya dayîra Keîla, bona dayîra xwe
tamîr kir. 18 Jê wêdetir birayên
wan, Bavvayê lawê Henadadê
serokê nêviya dayîra Keîla tamîr
kirin. 19 Li cem wê Ezerê lawê
Yêşûayê serokê Mîtspayê, li cîhê ku
dîwar dizivire, li hemberî kaşê çek-
darxaneyê qismekî wekî din tamîr
kir. 20 Jê wêdetir, Barûkê lawê
Zabbay, ji cîhê ku dîwar dizivire,
qismekî dinî heta deriyê mala Se-
rokkahîn Elyaşîb e, bi xîretê tamîr
kir. 21 Jê wêdetir, Meremotê lawê
Ûriyayê lawê Hakkots, ji deriyê
mala Elyaşîb ve heta cîhê ku mala
Elyaşîb diqede qismekî wekî din
tamîr kir. 22 Jê wêdetir, mirovên
hewze, kahînan tamîr kirin. 23 Jê
wêdetir, Benyamîn û Haşşûb, hem-
berî mala xwe tamîr kirin. Ji wan
wêdetir Azaryayê lawê Maaseyayê
lawê Ananya cem mala xwe tamîr
kir. 24 Jê wêdetir, Bînnûyê lawê
Henadad, ji mala Azarya heta cîhê
ku dîwar lê dizivire û heta qunci-
kê qismekî din tamîr kir. 25 Palalê
lawê Ûzay hemberî cîhê ku dîwar
lê difilite û qûleya ku ji mala qiral
ve derdikeve derve û li cem hewşa
parêzgeran e tamîr kir. Jê wêdetir
Pedayayê lawê Paroş tamîr kir.
26 Û Netînîm[1] li hemberî heta De-
riyê Avê ya berbi rojhilatê ye û
qûleya ku derdikeve derve li Ofelê
rûdiniştin. 27 Jê wêdetir, Tekoayi-
yan li hemberî qûleya mezin ya ku
derdikeve derve, heta dîwarê Ofelê
qismekî din tamîr kirin.
28 Kahînan jortirê Deriyê Hespan,
her kes jî hemberî mala xwe tamîr
kir. 29 Ji wan wêdetir Tsadokê lawê
Îmmer, hemberî mala xwe tamîr
kir. Û jê wêdetir Şemayayê lawê
Şekanyayê notirvanê Deriyê Roj-
hilatê ye tamîr kir. 30 Jê wêdetir
Hananyayê lawê Şelemya û Hanûnê
ku lawê şeşemînê Tsalaf e qismekî
wekî din tamîr kirin. Jê wêdetir
Meşûllamê lawê Berekya hemberî
odeya xwe tamîr kir. 31 Jê wêdetir
yek ji zêrkeran, Malkiya heta mala
Netînîm û bazirganan, li hemberî
Deriyê Mîfkadê û heta kaşa quncikê
tamîr kir. 32 Û navbera kaşa qunci-
kê û Deriyê Mîhan zêrker û bazirga-
nan tamîr kirin.

*Yên ku li dijî Selihandinê derdikevin*
Esr 4.4-5; 5.1-5

4 Û wusa bû ku, dema Sanballat
avakirina me yî dîwarê bihîst
xeyidî û zehf hêrs bû û qerfên
xwe bi Cihûdiyan re kir. 2 Û li ber
birayên xwe û artêşa Samîriyê ve
axifî û got: Ma ev Cihûdiyên la-
waz çi dikin? Qet dê wan berdin?
Ma dê qurbanê serjê bikin? Qey

---

1 An ji: Karmendên perestgehê.

dê di rojekê de biqedînin? Ma di
nav komikên tilxan de dê keviran
bivejînin? Lê belê ew jî şewitîne.
3 Û Tobiyayê Ammonî li cem
wî bû û got: Hela tiştê ku çêdi-
kin, ger çeqelek hilkişe ser, dê
dîwarên wanî kevirî xera bike! 4
Tu bibihîze, ya Xwedayê me; ji
ber ku me biçûk dibînin û heqa-
retên wan vegerîne seriyên wan û
di warê sirgûnê de wan bi talan-
bûnê bide destan! 5 Û fesadiya
wan nexumîne û bila sûcên wan
li ber te neyê paqij kirin! Ji ber
ku li ber yên ku ava dikin te hêrs
kirin. 6 Û me dîwar ava kirin û
wekî heta nêviyê bilindahiya wê
be, hemûya dîwêr hate yek kirin;
ji ber ku netewe di xebitandinê de
bi dil bû.
7 Û wusa bû ku, Sanballat û To-
biya û Ereban û Ammoniyan û
Aşdodiyan, dema bihîstin ku
tamîr kirina dîwarên Orşelîmê
pêş ve diçe û neqebên wê têne gir-
tin zehf xeyidîn 8 û bona ku ew
gişt pev re werin û li dijî Orşelîmê
cengê bikin û li wir tevliheviyê
derxînin, dûzenê danîn. 9 Lê belê
me ji Xwedayê xwe re dua kirin û
ji ber wan, bi şev û roj li dijî wan
notirvanan danîn. 10 Û Cihûda
got: Teqeta hemalan kêm dibe
û tilx zêde dibe û em nikarin vî
dîwarî çêbikin. 11 Û neyarên me
gotin: Heta ku em bikevin nava
wan, wan bukujin û kar bise-
kinînin dê fêhm mekin û nebînin.
12 Û wusa bû ku, dema Cihûdi-
yên ku li cem wan rûdinin hatin, ji
hemû cîhan deh carî ji me re: Divê
hûn vegerin cem me! gotin. 13 Li
ser vê yekê, li paşî dîwar, cîhên
wê yên herî nizm, li cîhên vekirî
netewê tevî şûr û rimên wan û bi
kevanên wan, li gor eşîrên wan
danîm. 14 Û nihêrtim û rabûm û ji
pêşhatiyan û karmendan û yên ku
ji ber netewê ve mayîne re gotim:
Ji wan metirsin! Xudanê ku me-
zin û bi rewnaq e di bîra xwe de
bînin û bona birayên xwe û law
û qîzên xwe, jinên xwe û xaniyên
xwe cengê bikin!
15 Û wusa bû ku, dema neyarên
me bihîstin ku fenekiya wan[1]
malûmî me bûye û Xwedê şîretên
wan li valahiyê derxistiye, em gişt
vegeriyan dîwar, ser karên xwe.
16 Û wusa bû ku, paşî wê nêviyê
xulamên min di kar de xebitîn û
nêviyê wan bi riman û mertalan û
kevanan û bi zirxan girtin û sero-
kan li paşî hemûya mala Cihûda
bûn. 17 Yên ku dîwar lêdikin û
yên ku bar dikişînin û lê dikin,
her kes bi destekî xwe di kar de
dixebite û bi destê xwe yî din bi
çekê xwe ve digirtin 18 û çêkeran,
her yek wekî şûrên wan di pişta
wan de bin ava dikirin. Û yê ku li
boriyê dixe li cem min bû. 19 Û ji

1 Ev kar, an jî: Fenekiya ku li dijî me saz kiribûn.

yên ku pêş tên û ji karmendan û
ji yên ku li pêy netewê mayîne re
gotim: Kar zêde ye û fireh e û em
li ser dîwêr bi cudayî, ji hev dûr-
tir in; 20 her ji ku derê hûn dengê
boriyê bibihîzin, li wir, li cem me
bicivin; dê bona me Xwedayê me
cengê bike!
21 Bi vî awayî em di kar de di-
xebitîn û nêviyê wan, ji dema
berbangê, heta ku sitêrk derkevin
bi riman ve digirtin. 22 Him jî
wê gavê ji netewê re gotim: Bila
her kes şevê tevî xulamê xwe li
Orşelîmê derbas bikin, da ku, bila
şevê ji me re bibin notirvan û bi
rojê bixebitin. 23 Û ne ez, ne bi-
rayên min, ne xulamên min, ne jî
notirvanên li paş min in, tu kes ji
me kincên xwe ji xwe nedikirin,
her kes tevî çekê xwe diçûn avê.

*Nehemya Alîkariyê bi xizanan re dike*
3.Mûs 25,35-46; 5.Mûs 15.7-11

5 Wê gavê li dijî birayên wan
Cihûdiyan, qêrînên mezin ên
gel û jinên wan çêbûn. 2 Û hin ke-
san digotin: Em, law û qîzên me,
zêdeyî ne; divê em genim bistînin
ku, bixwin û sax bimînin! 3 Û yên
din digotin: Ji ber xelayê, bona ku
genim bistînin, em zevî û rez û xa-
niyên xwe bi gerewî[1] didin. 4 Lê
hin kesan jî digotin: Bona nerxa
qiral me li ser zevî û rezên xwe ve
perê deyn stendin. 5 Û niha goştên
me, mîna goştên birayên me ne,
lawên me mîna lawên wan in û a
vay, em law û qîzên xwe dixin bin
dîlitiyê û ji qîzên me, yên ku wan
kirine cariye jî hene û di destê me
de çareyek nîne; ji ber ku zevî û re-
zên me yên kesên wekî din in.
6 Dema qêrîna wan û van gotin-
an bihîstim, zehf hêrs bûm. 7 Di
hundirê xwe de bi dilê xwe ve
şêwirîm, bi yên ku pêş ve tên û
bi karmendên hukûmetê ve ke-
tim keftûleftê û ji wan re gotim:
Hûn, gişt ji birayên xwe ve zehf
selefê distînin! Û li dijî wan civa-
kek mezin çêkirim. 8 Û ji wan re
gotim: Birayên me Cihûdiyan, ên
ku ji neteweyan re hatine firotin,
heta ku ji destê me tê me stendine,
lê qey hûn birayên xwe difroşin
û ma qey bila ew ji me re bên
firotan? Û bêdeng bûn û gotinek
ku bibêjin nedîtin. 9 Û gotim: Ev
karê ku hûn dikin ne qenc e! Ji ber
heqareta neteweyên ku neyarên
me ne, ma hewce nake ku hûn di
tirsa Xwedê de bimeşin? 10 Bi-
rayên min, xulamên min û ez, em
jî genim û zîvê bi deyn didin wan.
Ez rica dikim, destên xwe ji vê
selefa zêde bikişînin. 11 Ez rica
dikim, îroj zevî û rez û zeytûngeh
û xaniyên wan û ji sedî yekê zîv û
genim û xemra nû û rûnê ku hûn
ji wan distînin, şunda bidin wan.
12 Û gotin: Em ê şunda bidin û tu

[1] Mişkane, an jî: Rehin.

tiştekî ji wan nexwazin; tu çawa
dibêje, em ê wusa bikin! Û bangî
kahînan kirim û di derheqê ku dê
li gor vê gotinê bikin de, sondê
bi wan re dam dayîn. 13 Him jî
dawa xwe hilweşandim û gotim:
Bila Xwedê, her zilamê ku bi vê
gotinê negire ji mal û karê wî, bi
vî awayî daweşîne û vala bike!
Û hemûya civakê gotin: Amîn! û
şikiryê ji XUDAN re kirin. Û ne-
tewe li gor vê gotinê kirin.
14 Xeynî vêya ji roja ku ji warê
Cihûdayê emrê walîbûnê ji min
re hatîbû dayîn, di bîst saliya qiral
Artahşaşta de heta sala wî ya sîh
û duwemîn, donzdeh sal, ez û bi-
rayên min, me nanê walî nexwa-
rin. 15 Lê belê waliyên berê, ên ku
berî min bûne walî li ser netewê
bûn bar û ji wan, xeynî çel şekel[1]
zîv, nan û xemrê sitendin; heta
xulamên wan jî misalatî netewê
bûn; lê belê ez, ji ber tirsa Xwedê
tiştekî wusa nekirim. 16 Him jî vî
karê dîwêr domandim, me zevi-
yekê jî nestendin û hemû xulamên
min li wir, li ser kar civiyabûn. 17
Û xeynî yên ku ji neteweyên dora
me ne tên cem me, ji Cihûdiyan
û ji karmendan sed û pêncî kes di
sifra min de rûdiniştin. 18 Û yê
ku bona rojekê dihat amade kirin,
gayek û şeş mîhên bijartî bûn û
bona min mirîşkan û di her deh
rojî de carekî ji her cûreyî zehf
xemr dihatin ava kirin; tevî ku
wusa ye li nanê walî negeriyam,
ji ber ku koletî li ser vê neteweyê
giran bû. 19 Ya Xwedayê min, her
tiştên ku di oxra vê netewê de ki-
rime, bona min bi qenciyê ve di
bîr de bîne!

*Lîstikên li dijî Nehemya têne çêkirin*

6 Û wusa bû ku, dema ava kiri-
na minî dîwar û tê de nemayî-
ya neqeban, ji Sanballat û Tobiya
û Geşemê Ereb û neyarên me yên
wekî din re, hate agahî kirin, – lê
heta wê wextê tenê perikan bi de-
riyan ve nexistibûm – ; 2 Sanballat
û Geşem ji min re şandin û gotin:
Were, em di deşta Ono de, di gun-
dekî de hev bibînin! Lê belê ew
bona ku xerabiyê bi min bikin, di-
fikiriyan. 3 Û şandiyan ji wan re
şandim û gotim: Ez karekî mezin
çêdikim û nikarim dakevim; ma
çima heta ku ez berdim û dakevim
cem we bila kar bisekine? 4 Û li gor
vê gotinê çar carî ji min re şandin û
li gor vê gotinê bersivê dam wan.
5 Û Sanballat li gor vê gotinê cara
pêncan xulamê xwe ji min re şand û
di destê wî de nameya vekirî hebû,
6 di wê de wusa nivîsandî bû: Di
nava netewan de tête bihîstin û
Gaşmû dibêje, tu û Cihûdî li gor
gotinê serîhildanê difikirin û li gor
gotinê tu vî dîwarî bona wê lêdike
û li gor van gotinan tu dixwazî ku

[1] Li rasteka menan binêrin.

ji wan re bibe qiral. 7 Ji bo ku bi
gotina: Li Cihûdayê qiral heye! di
derheqê te de wazê bikin te pey-
xamberan jî tayîn kiriye û niha dê li
gor van gotinan ji qiral re bête gotin.
Niha were ku em pev re bişêwirin.
8 Wê gavê ji wî re şandim û gotim:
Tiştekî mîna gotinên ku te gotine
nebûye, lê belê tu wan ji dilê xwe
ve lêdikî. 9 Ji ber ku hemûyên wan
bi gotina: Dê ji kar ve dest bikişînin
û dê neyê kirin, xwestin ku me bi-
tirsînin. Lê belê ya Xwedê, niha
quwetê bide destê min!
10 Û ez çûm mala Şemayayê lawê
Delayayê lawê Mehatabel, ê ku
xwe girtibû mala xwe û ji min re
got: Di mala Xwedê de, di hundirê
perestgehê de em hev bibînin û de-
riyên perestgehê bigirin; ji ber ku
dê bona kuştina te werin; belê, dê
bona ku te bukujin şevê werin! 11
Û gotim: Ma zilamekî mîna min
qet direve? Û li dêvila min kî bibe
ma qet bona sax bimîne direve
perestgehê? Ez nakevimê! 12 Û
fêhm kirim, a vay, Xwedê wî ne-
şandibû, lê belê vê peyxambertiyê
li dijî min gotibû û Tobiya û San-
ballat bi mişe wî girtibûn. 13 Bo
vê yekê bi mişe hatibû girtin ku,
ez bitirsim ku wusa bikim û sûcê
bikim û bona ku keftûlefta min
bikin agahiyek xerab bi destên
wan keve. 14 Ya Xwedayê min,
Tobiya û Sanballat û him jî pey-
xamber Noadya pîrek, ya ku xwest
min bitirsîne û peyxamberên din li
gor van karên wan di bîr de bîne!

*Selihandina Sûran diqede*

15 Û dîwar, di roja pêncî û dudan
de, di roja bîst û pêncê Îlonê de
hate temam kirin. 16 Û wusa bû
ku, hemû neyarên me dema bihîs-
tin, hemû neteweyên ku li dora
me ne tirsiyan û di çavên xwe de
zehf ketin; ji ber, fêhm kirin ku
ev kar ji aliyê Xwedayê me ve
hatiye kirin. 17 Him di wan ro-
jan de pêşhatiyên Cihûdan, gellek
nameyan ji Tobiya re dişandin û
nameyên Tobiya ji wan re dihatin.
18 Ji ber ku li Cihûdayê, zilamên
ku jê re sondê dayîne hebûn, ji
ber ku ew bi xwe zavê Şekanyayê
lawê Arah bû û lawê wî Yeho-
hanan, qîza Meşûllamê lawê
Berekya girtibû. 19 Li ber min jî
di derheqê qenciya wî de digotin
û gotinên min ji wî re dibirin. Û
Tobiya bona ku min bitirsîne, na-
meyan dişand.

7 Û wusa bû ku, dîwar hatibû
çêkirin, bazikên derî ji aliyê
min ve hatibû pêvekirin, heta der-
gevan, qesîdevan û Lêwiyiyan
bên wezîfedar kirin, 2 birayê xwe
Hananî û serokê bircê Hananya bi
ser Orşelîmê ve kirim karmend;
ji ber ku ev zilam dilsoz bû û ji
gellekan zêdetir ji Xwedê ve di-
tirsiya. 3 Û ji wan re gotim: Heta

ku roj germ bibe bila deriyên
Orşelîmê venebin; dema ew no-
bedariyê dikin, bila deriyan bigi-
rin û hûn jî zendê li wan ba bidin
û wekî her kes li nobedariya xwe
û her kes li hemberî mala xwe, ji
yên ku li Orşelîmê rûdinin nobe-
daran deyne. 4 Û bajar mezin û
fireh bû û tê de netewe hindik bû
û xanî nehatibûn ava kirin.

*Lîsteya yên ku ji Sirgûnê vegeriyane*

5 Û bona ku li gor regezên xwe
bên jimartin, Xwedê civandina
pêşhatiyan û karmendên hikû-
metê û netewê xist dilê min. Pir-
tûka regeza yên ku berê derketine
dîtim û di hundirê wê de nivîsandî
dîtim. 6 Yên ku ji sirgûnên qiralê
Babîlê Nebûkadnetsar wan ajoti-
ye, derketine û ji bo her kes were
bajarê xwe, geliyên welêt ên ku
vegeriyane Cihûda û Orşelîmê
ev in; 7 vana tevî Zerûbbabel,
Yêşûa, Nehemya, Azarya, Raa-
maya, Nahamanî, Mordekay,
Bîlşan, Mîsperet, Bîgvay, Nehûm
û Baana hatin.
Hejmara zilamên ku ji netewa Îs-
raêlê ne: 8 Lawên Paroş, du he-
zar û sed û heftê û dudo. 9 Lawên
Şefatya, sê sed û heftê û dudo.
10 Lawên Arah, şeş sed û pêncî û
dudo. 11 Ji lawên Yêşûa û Yoab,
lawên Pahat-Moab, du hezar û
heyşt sed û hîjdeh. 12 Lawên
Elam, hezar û du sed û pêncî û çar.
13 Lawên Zattû, heyşt sed û çel û
pênc. 14 Lawên Zakkay, heft sed
û şêst. 15 Lawên Bînnûy, şeş sed
û çel û heyşt. 16 Lawên Bebay
şeş sed û bîst û heyşt. 17 Lawên
Azgad du hezar û sê sed û bîst û
dudo. 18 Lawên Adonîkam şeş
sed û şêst û heft. 19 Lawên Bîgvay
du hezar û şêst û heft. 20 Lawên
Adîn şeş sed û pêncî û pênc. 21 Ji
Hîzkiya lawên Ater, nod û heyşt.
22 Lawên Haşûm, sê sed û bîst û
heyşt. 23 Lawên Betsay, sê sed û
bîst û çar. 24 Lawên Harîf, sed û
donzdeh. 25 Lawên Gîbeon; nod
û pênc. 26 Zilamên Beytlehem û
Netofayê, sed û heyştê û heyşt.
27 Zilamên Anatot, sed û bîst
û heyşt. 28 Zilamên Beyt-Az-
mavetê, çel û dudo. 29 Zilamên
Kîryat-Yearîm, Kefîra û Beerotê,
heft sed û çel û sisê. 30 Zilamên
Rama û Gebayê, şeş sed û bîst û
yek. 31 Zilamên Mîkmasê sed û
bîst û dudo. 32 Zilamên Beytel û
Ayê, sed û bîst û sê. 33 Zilamên
Nebo yên din, pêncî û dudo.
34 Lawên Elam yên din, hezar û
du sed û pêncî û çar. 35 Lawên
Harîm, sê sed û bîst. 36 Lawên
Erîhayê, sê sed û çel û pênc.
37 Lawên Lod, Hadîd û Ono, heft
sed û bîst û yek. 38 Lawên Senaa,
sê hezar û neh sed û sîh.
39 Kahînan: Ji mala Yêşûa, lawên
Yedaya, neh sed û heftê û sisê.
40 Lawên Îmmer, hezar û pêncî

û dudo. 41 Lawên Paşhûr, hezar
û du sed û çel û heft. 42 Lawên
Harîm, hezar û hivdeh.
43 Lêwiyiyan: Ji lawên Hodeva,
lawên Yêşûa û Kadmîel, heftê
û çar. 44 Qesîdevanan: Lawên
Asaf, sed û çel û heyşt. 45 Dergevanan: Lawên Şallûm, lawên
Ater, lawên Talmon, lawên Akkûb, lawên Hatîta, lawên Şobay,
sed û sîh û heyşt.
46 Netînîm: Lawên Tsîha, lawên
Hasûfa, lawên Tabbaot, 47 lawên
Keros, lawên Sîa, lawên Padon,
48 lawên Lebana, lawên Hagaba, lawên Salmay, 49 lawên Hanan, lawên Gîddel, lawên Gahar,
50 lawên Reaya, lawên Retsîn,
lawên Nekoda, 51 lawên Gazzam, lawên Ûzza, lawên Paseah,
52 lawên Besay, lawên Meûnîm,
lawên Nefûşesîm, 53 lawên Bakbûk, lawên Hakûfa, lawên Harhûr,
54 lawên Batslît, lawên Mehîda, lawên Harşa, 55 lawên Barkos, lawên Sîsera, lawên Temah,
56 lawên Netsîah, lawên Hatîfa.
57 Lawên qûlên Silêman: Lawên
Sotay, lawên Soferet, lawên Perîda, 58 lawên Yaala, lawên Darkon,
lawên Gîddel, 59 lawên Şefatya,
lawên Hattîl, lawên Pokeret-Hatsebaîm, lawên Ammon. 60 Hemûya
Netînîmê tevî lawên qûlên Silêman, sê sed û nod û dudo.

61 Yên ku ji Tel-Melahê, Tel-Harşayê, Kerûbê, Addonê û Îmmerê ve derketine, lê nedane
xuyanî kirin ku nîjad û malên
bapîrên wan ji Îsraêlê ne vana ne:
62 Lawên Delaya, lawên Tobiya, lawên Nekoda, şeş sed û çel
û dudo. 63 Û ji kahînan: Lawên
Hobiya, lawên Hakkots, lawên
Barzîlay, ên ku ji qîzên Barzîlayê
Gîleadî jin stendine û li gor navên wan tên bang kirin. 64 Vana
di nava yên ku bi regezê ve têne
hesibandin, li qeyda xwe geriyan,
lê belê nehat dîtin û bi mindarî hatin hesibandin ji kahîntiyê ve hatin derxistin. 65 Û heta ku Ûrîm
û Tûmmîm û kahînek dernekeve,
bona ku ji tiştên herî pîroz nexwin
walî ji wan re got.
66 Xeynî heft hezar û sê sed û sîh
û heft dîl û cariyeyan, 67 hemûya
civakê, bi tûmî, çel û du hezar û
sê sed û şêst kes bûn û jin û zilam,
du sed û çel û pênc qesîdevanên
wan hebûn. 68 Heft sed û sîh û şeş
hespên wan, du sed û çel û pênc
qantirên wan; 69 çar sed û sîh û
pênc deveyên wan; şeş hezar û
heft sed û bîst kerên wan hebûn.
70 Û ji nava serokên malên
bapîran, hinekan bona kar xelatê
dan. Walî hezar darîk[1] zêr, pêncî legan, pênc sed û sîh qutikê
kahîn dan xezîneyê. 71 Û ji nava
serokên malên bapîran, hinekan,
bîst hezar darîk zêr û du hezar û

[1] Li rasteka menan binêrin.

du sed mina zîv dan xezîna kar.
72 Û yên ku ji netewê wekî din
dane, bîst hezar darîk zêr û du he-
zar mina zîv û şêst û heft qutikê
kahîn bû.
73 Û kahînan û Lêwiyiyan û der-
gevan û qesîdevanan û hinekên ji
netewê û Netînîm û hemûya Îs-
raêlê di bajarên xwe de rûniştin.
Û dema meha heftemîn hat, lawên
Îsraêl jî li bajarê xwe bûn.

*Esra Pirtûka Zagonê ji Gel re dixwîne*
5.Mûs 31,10-13

8 Û hemûya netewê, mîna zila-
mek bin, li qada ku li hemberî
Deriyê Avê ye civiyan û bona ku
pirtûka zagona Mûsa, ya ku XU-
DAN ji Îsraêlê re emir dayiye
bîne, ji nivîskar Esra re gotin. 2
Û di roja yekem ya meha heftan
de, kahîn Esra zagonê anî ber ci-
vakê, jin û mêr û heçiyên ku bi
fêhm karî guhdarî dikin. 3 Û li ber
qada ku li hemberî Deriyê Avê ye,
li ber jin û mêr û yên ku dikarin
fêhm bikin, ji tîrêja sibehê, heta
nîvrojê ji wê xwend û hemûya
netewê guh dan pirtûka zagonê.
4 Û nivîskar Esra, li ser mîmbera
darîn ya ku bona vî karî çêkiribûn
sekinî û li kêleka wî, li aliyê wî yê
rastê Mattîtya û Şema û Anaya û
Ûriya û Hîlkiya û Maaseya û li ali-
yê wî yê çepê Pedaya û Mîşael û
Malkiya û Haşûm û Haşbaddana.
Zekarya û Meşûllam sekinîn. 5 Û
Esra li ber çavê hemûya netewê
pirtûkê vekir, ji ber ku cîhê wî ji
yên hemûya netewê bilindtir bû
û dema wê vekir, hemûya netewê
rabûn ser pêlan. 6 Û Esra Xwe-
dayê mezin, XUDAN pîroz kir û
hemûya netewê destên xwe hildan
û bi gotina: Amîn! Amîn! bersivê
dan û serî xwar kirin û xwe avêtin
erdê û ji XUDAN re secde ki-
rin. 7 Û Yêşûa û Banî û Şerebya,
Yamîn, Akkûb, Şabbetay, Ho-
diya, Maaseya, Kelîta, Azarya,
Yozabad, Hanan, Pelaya û Lêwi-
yiyan zagonê ji gel re gotin û
netewe li cîhê xwe ve sekinîbûn.
8 Û ji pirtûkê, ji zagona Xwedê ve
bi eşkeretî xwendin û mahna wê
dan û tiştên ku xwendine ji wan
re rave kirin.
9 Û walî Nehemya û nivîskar û
kahîn Esra û Lêwiyiyên ku hînî
netewê dikin, ji hemûya netewê
re gotin: Îroj, bona Xwedayê we
XUDAN pîroz e; şînê nekişînin
û negirîn! Ji ber ku hemû nete-
we, dema gotinên zagonê guhdarî
dikirin digiriyan. 10 Û ji wan re
gotin: Herin rêya xwe, yê bi rûn
bixwin, ya şêrîn vexwin û ji yê
ku amadekariya wî nîne re parê
bişînin; ji ber ku îroj bona Xudanê
me pîroz e û ne bi keser bin; ji ber
ku şabûniya XUDAN, hêza we
ew e! 11 Û Lêwiyiyan gotin: Hiş
bin, ji ber, îroj pîroz e û bi gotina;
bi keser nebin, hemûya netewê

bê deng kirin. 12 Û hemûya ne-
tewê, bona ku bixwin, vexwin û
paran bişînin û şahiyekî mezin çê-
bikin bi rêyên xwe ve çûn, ji ber,
gotinên ku hatibûn agahî kirin
fêhm kirin.
13 Û di roja duwem de, serokên
malên bapîrên hemûya netewê,
kahînan û Lêwiyiyan, bona ku
gotinên zagonê fêhm bikin, li cem
nivîskar Esra civiyan. 14 Û bona
ku lawên Îsraêl, di cejna meha
heftemîn de li haymeyan rûnin
15 û bona ku bi gotina: Hilkişin
çiyê û bona çêkirina haymeyên
ku wekî hatiye nivîsandin guliyên
zeytûnê û guliyên zeytûna bejî û
guliyên mersînê û guliyên xur-
mê û guliyên darên pihêt bînin, li
hemû bajaran û Orşelîmê ve bidin
bihîstin û bang kirin, di zagonê de
nivîsandî dîtin ku XUDAN çawa
bi navdîtiya Mûsa ve emir dayi-
ye! 16 Û netewe hilkişiyan û wan
anîn û her kes li ser xaniyên xwe
û di hewşên xwe de û di hewşên
mala Xwedê de û di qada Deriyê
Avê de û di qada Deriyê Efrayîm
de ji xwe re haymeyan çêkirin. 17
Û hemû civaka yên ku ji sirgûnê
ve şunda vegeriyane haymeyan
çêkirin û di haymeyan de rûniştin:
ji ber ku ji rojên Yêşûyê lawê Nûn
heta wê rojê, lawên Îsraêl tu carî
wusa nekiribûn. Û kêfxweşiyekî
zehf mezin çêbû. 18 Û her roj, ji
roja pêşîn heta roja paşîn, ji pir-
tûka zagona Xwedê ve xwend.
Û heft roj cejnê çêkirin û di roja
heyştemîn de li gor ûsilê civaka
pîroz çêbû.

*Gelê Îsraêlê li gunehên xwe mukir tên*

9 Û di roja bîst û çarê vê mehê
de lawên Îsraêl civiyan. Hemû-
yan rojî girtibûn û cilik[1] li ser wan
û di serê wan de ax hebû. 2 Û nîja-
da Îsraêlê ji hemû biyanan ve cuda
bûn û sekinîn û li sûcên xwe û fe-
sadiyên bapîrên xwe mukur hatin.
3 Û li cîhê ku sekinîne rabûn ser
pêlan û di çar demî demek rojê
de ji pirtûka zagona Xwedayê
xwe XUDAN ve xwendin û di
çar demên rojê demekî de li sûcên
xwe mukur hatin û ji Xwedayê
xwe XUDAN re secde kirin. 4 Û
Yêşûa û Banî, Kadmîel, Şebanya,
Bûnnî, Şerabya, Banî û Kenanî,
li ser pêlika Lêwiyiyan rabûn ser
pêlan û bi dengekî bilind ji Xwe-
dayê xwe XUDAN re qêriyan.
5 Û Yêşûa û Kadmîel, Banî,
Haşabneya, Şerebya, Hodiya,
Şebanya û Petahya. Lêwiyiyan
gotin: Rabin ser pêlan û Xwe-
dayê xwe XUDAN ji destpêkê[2]
heta abadînê pîroz bikin! Û bila
navê te yê ji her pîrozî û şikiryê
mezintir e pîroz be! 6 Tu, tenê tu

[1] Yanê çûl.

[2] Ji mêj ve.

XUDAN î, te ezmanan, ezmanê
ezmanan û hemû artêşên wê, erdê
û hemû tiştên li ser wê ne, beh-
ran û hemû tiştên ku di wan de
ne afirandiye û tu wana giştikan
diparêze û artêşa ezmanan ji te re
secde dike. 7 Ya XUDAN, tu ew
Xwedayî ku, te Abram bijart û ji
Ûr a ku bajarê Kîldaniyan e, wî
derxist û navê Birahîm lêkir 8 û
te dilê wî li ber xwe dilsoz dît û
bona ku welatê Kenaniyan, Hît-
tiyan, Amoriyan û Perizziyan û
Yebûsiyan û Girgaşiyan tu bide
nîjada wî, te bi wî re peymanê
danî û te gotinên xwe anî cîh; ji
ber ku tu bi dadî yî.
9 Û te zebûniya bapîrên me ya li
Misirê dît û li cem Behra Gewez
te feryada wan bihîst 10 û te li ser
Fîrawûn û li ser hemû qûlên wî û li
ser hemû neteweyên welatan nîşan
û nuwazeyan da xuyakirin; ji ber,
te pê zanî bû ku li dijî wan harikiyê
dikin û mîna ku îroj wusa ye, te ji
xwe re nav qezenc kir. 11 Û te li ber
wan behrê qelişand û di nava behrê
de, ji cîhê ziwa ve derbas bûn û te,
yên ku bera pêy wan dane mîna ke-
virekî avêt avên bihêz, balûpalan.
12 Û rojê di sitûna ewrê de û bona
di rêya ku bimeşin de tîrêjê bidî
wan şevê di sitûna agir de, rê nîşanî
wan da. 13 Û tu daket ser çiyayê
Sinayê û ji ezmanan ve bi wan re
hevpeyvînê kir û te daraziyên rast
û şerîetên rasteqîn, zagonên qenc
û emiran da wan 14 û te roja xwe
yî pîroz Sebtê ji wan re got[1] û bi
navdîtiya qûlê xwe Mûsa, te emi-
ran û zagonan û şerîetekê ji wan re
emir kir 15 û dema birçî bûn, te ji
ezmanan nan da wan û dema tî bûn,
te ji zinarê av ji wan re derxist û te
bona ku ji xwe re bikin milk, bike-
vin welatê ku ji bo bidî wan te sond
daye, emir li wan kir.
16 Lê belê wan û bavên me ha-
ritiyê kirin û histuyên xwe hişk
kirin û emirên te guhdarî nekirin
17 û nexwestin ku gotinan guhdarî
bikin û qala nuwazeyên ku te di
nava wan de kiriye nekirin, tenê
histuyên xwe hişk kirin û bona ku
di dijrabûnên xwe de vegerin dîli-
tiya xwe yî berê serokekî danîn.
Lê belê tu Xwedayê lêborînê dikî,
xêrê dikî, zehf heyfa wî lê tê û de-
reng bi hêrsê dikevî û yê xêra wî
zêde yî û te wan berneda. 18 Heta
dema ku bona xwe golika rijandî
çêkirin û: Xwedayê te yê ku te
ji Misirê derxistiye ev e! gotin û
kufra mezin kirin jî, 19 te ji ber
gellek dilovaniyên xwe, wan li
çolê berneda; bona ku rê nîşanî
wan bidin, bi rojê sitûna ewr û
bona rêya ku tê de bimeşin rohnî
bike, şevê sitûna agir ji ser wan
ve neqetiya. 20 Û te, bona ku bide
hîn kirin, Ruhê xwe yî qenc da
wan û mannê ji devê wan nepa-

1 Gihandin wan.

rast û dema tî bûn, te avê da wan.
21 Û çel sal te li çolê wan xwedî
kir û qet kêmasiyên wan tune bûn,
kincên wan kevin nebûn û lingên
wan newerimîn. 22 Û te welat û
neteweyan da wan û li gor parên
wan, te wan par kir û welatê Sîhon
û welatê qiralê Heşbonê û welatê
Ogê qiralê Başanê ji xwe re kirin
milk. 23 Te lawên wan jî mîna
sitêrkên ezmanan zêde kir û te wan
xist welatê ku te ji bapîrên wan re
gotibû ku wê ji xwe re bi milkî bi
dest ve bixînin. 24 Û lawên wan
ketinê û welat bi milkî bi dest ve
xistin û te li ber wan li yên ku li
welêt rûdinin, li Kenaniyan ve
histu xwar kir û ji wan re, bona ku
li gor kêfa xwe bikin, wan û qiralên
wan û neteweyên welat da destên
wan. 25 Û bajarên bi dîwar û erdên
bi rûn[1] girtin û hemû malên ku bi
tiştên qenc ve tijî, sarincên hatine
kolandin, rez û zeytûniyan û darên
ku bi zêdeyî mêwan didin ji xwe
re kirin milk û xwarin û têr bûn û
qelew bûn û bi qenciya te yî mezin
zewqê dîtin.
26 Lê belê wan bêîtaetkarî kirin û
li dijî te bûn asê û zagona te avêtin
paş xwe û peyxamberên te yê ku
bona wan vegerînin te, li dijî wan
şahdeyiyê kirin kuştin û kufirên
mezin kirin. 27 Û te wan da destê
neyarên wan û tengasiyê da wan û
di dema tengasiya xwe de feryadê
ji te re kirin û te ji ezmanan ve
bihîst û bi gellek dilovaniyên xwe
xelaskariyê da wan, vana jî wan ji
destê neyaran ve xelas kirin. 28 Lê
belê dema aramiyê dîtin, dîsa li ber
te xerabiyê kirin, ji ber vê yekê, te
wan di destên neyarên wan de xist
û li ser wan serweriyê ajotin, lê
belê gava ew vegeriyan û feryadê
ji te re kirin, te ji ezmanan wan
bihîst û li gor rehmên xwe te pirr
caran wan xelas kir 29 û bona ku
wan vegerînin ser zagona xwe, te
li dijî wan şahdeyiyê kir. Lê belê
haritiyê kirin û emirên te guhdarî
nekirin, lê belê li dijî daraziyên te
bi sûc bûn; ew daraziyên ku mi-
rov bi çêkirina wan dijî û sermilên
xwe ji bar ve revandin û histuyên
xwe hişk kirin û guhdarî nekirin.
30 Lê belê te li dijî wan pirr sa-
lan sebir kir û te bi Ruhê xwe û bi
navdîtiya peyxamberên xwe li dijî
wan şahdeyiyê kir; lê belê guh ne-
danê û te wan da destê neteweyên
welatan. 31 Lê belê ji ber gellekî
dilovaniyên xwe, te bi tûmî wan
neqedand û dev ji wan berneda; ji
ber ku tu Xwedayek keremkar û
dilovan e!
32 Û niha, ya Xwedayê me, Xwe-
dayê mezin, biqudret û bi sawêr[2], ê
ku peyman û xêrê diparêze, ji rojên
qiralên Asûrê heta îroj, zehmeta ku

[1] An jî: Bi berdar.

[2] Hêbet, heybet.

hatiye serê qiralên me, serokên me
û kahînên me û peyxamberên me
û bavên me û hemûya netewa te,
bila giştika zehmeta ku hatiye serê
me di çavê te de hindik neyê xuya
kirin! 33 Lê belê tu di her tiştê ku
tête serê me de bi dadî ye, ji ber
ku te bi rasteqîniyê kir, lê belê me
xerabiyê kirin 34 û qiralên me, se-
rokên me, kahînên me û bavên me
bi zagona te ve negirtin û emirên
şahdeyiya ku te li ber wan kiriye
û şahdeyiyên te guhdarî nekirin.
35 Û li welatê xwe, di nava qenci-
ya zêde de ya ku te daye wan û li
warê fireh û berdar ya ku te dayiye
ber wan ji te re qûlitiyê nekirin û
ji karên xwe yî xerab venegeri-
yan. 36 A vay, îroj em xulam in û
welatê ku bona berê wê û qenciya
wê bixwin te daye bapîrên me, a
vay, em li ser wê xulam in! 37 Û
gellek berê dide qiralên ku te ji
ber sûcên me daniye ser me û ew
li ser bedenên me û heywanên me,
li gor kêfa xwe serweriyê dajon û
em di tengasiya mezin de ne!

*Gel Peymanê tesdîq dike*

38 Û tim ji ber vê yekê em pey-
manek xwurt dikin û wê dini-
vîsînin û serokên me, Lêwiyiyên
me û kahînên me wê mor dikin.

10 Û yên ku mor kirin vana ne:
Walî Nehemyayê lawê Ha-
kalya û Tsedekya, 2 Seraya, Azar-
ya, Yêremya, 3 Paşhûr, Amar-
ya, Malkiya, 4 Hattûş, Şebanya,
Mallûk, 5 Harîm, Meremot, O-
badya, 6 Danîêl, Gînneton, Barûk,
7 Meşûllam, Abiya, Miyamîn,
8 Maazya, Bîlgay, Şemaya; vana
kahînan bûn. 9 Û Lêwiyiyan:
Yêşûayê lawê Azanya, ji lawên
Henadad, Bînnûy, Kadmîel 10 û
birayên wan Şebanya, Hodiya,
Kelîta, Pelaya, Hanan, 11 Mîka,
Rehob, Haşabya, 12 Zakkûr,
Şerebya, Şebanya, 13 Hodiya,
Banî, Benînû. 14 Serokên nete-
wê: Paroş, Pahat-Moab, Elam,
Zattû, Banî, 15 Bûnnî, Azgad,
Bebay, 16 Adoniya, Bîgvay, Adîn,
17 Ater, Hîzkiya, Azzûr, 18 Ho-
diya, Haşûm, Betsay, 19 Harîf,
Anatot, Nobay, 20 Magpîaş,
Meşûllam, Hezîr, 21 Meşezabel,
Tsadok, Yaddûa, 22 Pelatya, Ha-
nan, Anaya, 23 Hoşeya, Hananya,
Haşşûb, 24 Halloheş, Pîlha, Şobek,
25 Rehûm, Haşabna, Maaseya
26 û Ahiya, Hanan, Anan,
27 Mallûk, Harîm, Baana.
28 Û wekî din ên netewê,
kahînan, Lêwiyiyan, dergevanan,
qesîdevanan, Netînîm û heçiyên ku
li gor zagona Xwedê ji neteweyên
welat ve qetiyane, jinên wan,
lawên wan û qîzên wan, heçî
kesên ku zanîn û fêhmkariyên
wan hene, 29 bi birayên xwe re û
bi yên ku pêş ve tên yek bûn û bi
gotina: Bona di zagona Xwedê ya

ku bi destê Mûsayê qûlê Xwedê
ve hatiye dayîn de bimeşin û
bona kirin û girtina hemû zagon,
emir û daraziyên Xudanê me
XUDAN, 30 em ê qîzên xwe
nedin neteweyên welatan û ji
lawên xwe re qîzên wan nestînin
31 û ger neteweyên welêt bona ku
pertal[1] û her tewrî genimî bifroşin
di roja Sebtê de bînin, di roja
Sebtê de an jî di rojekî pîrozî din
de em ê ji wan nestînin û em ệ dev
ji sala heftan û stendina her deynî
berdin! ketin lanetê û sondê.
32 Û bona xizmeta mala Xwe-
dayê me, bona nanê aramiyê û
bona pêşkêşiya nan ya daîmî
û bona pêşkêşiya daîmî ya tête
şewitandin, bona rojên Seb-
tê, serên mehan û cejnên hatine
eşkere kirin 33 û bona tiştên pîroz
û ji bo pêşkêşiyên sûcê ên ku bona
ji Îsraêlê re bikin kefaret û bona
her karên mala Xwedayê me, ji bo
em her sal parekî ji sê par şekelê
bidin, me ji xwe re zagonan danîn.
34 Û bona ku em li ser pêşkêşiya
Xwedayê xwe XUDAN, li gor
ku di zagonê de nivîsandiye
bişewitînin, li gor malên bapîrên
xwe ji salê heta salê di demên
eşkere de, bona pêşkêşiya êzingan
bînin mala Xwedayê me 35 û ji
salê heta salê, bona hemû nûberên
erdên xwe û nûberên mêwên her
tewr daran bînin mala XUDAN
36 û li gor ku di zagonê de nivî-
sandiye, bona pêşîbûyiyên law û
heywanên xwe û pêşîbûyiyên ga
û mîhên xwe bînin mala Xwe-
dayê me, ji kahînên ku di mala
Xwedayê me de xizmetê dikin re
bînin 37 û bona nûberên hevîrê
xwe û pêşkêşiyên xwe yî rakirinê
û mêwên her tewr daran, xemr û
rûnê nû ji kahînan re û ji odeyên
mala Xwedayê xwe re û bona ku
dehekiya erdên xwe ji Lêwiyiyan
re bînin, em, kahînan, Lêwiyiyan
û netewê, pişkê kişandin; ji ber ku
di hemû bajarên me yî cotkariyê de
Lêwiyiyan dehekê distînin. 38 Û
dema Lêwiyiyan dehekê distînin,
dê bi Lêwiyiyên kahîn ên lawên
Harûn in, pev re bibin û Lêwiyi-
yan dê pariyek ji dehekê hilkişînin
Mala Xwedayê me, odeyan, mala
xezîneyê. 39 Ji ber ku lawên Îsraêl
û lawên Lêwî pêşkêşiya rakirinê
ya genim û xemra nû û rûn, bînin
odeyên ku taximên perestgehê û
kahîn û dergevan û qesîdevanên
ku tê de ne. Û bi vî awayî em ê dev
ji mala Xwedayê xwe bernedin.

*Ên ku li Orşelîmê dijîn*

11 Û serokên netewê li
Orşelîmê rûniştin û yên din
ên netewê, ji deh kesî kesekî anîn
û bona ku ew li bajarê pîroz, li
Orşelîmê rûnê û neh kesên wê li
bajarên wekî din bimînin, pişkê

[1] Yanê alav.

avêtin. 2 Û netewe, hemû zilamên
ku bi dil li Orşelîmê rûnin, xwe
pêş ve dane, pîroz kirin.
3 Û serokên wilayetan ên ku li
Orşelîmê rûniştine vana ne. Lê di
bajarên Cihûda de, Îsraêl, kahînan
û Lêwiyiyan û Netînîm[1] û lawên
qûlên Sillêman, wekî her kes di
milkê xwe de, di bajarên xwe de
rûniştin. 4 Û hinekên ji lawên
Cihûda û ji lawên Benyamîn li
Orşelîmê rûniştin. Ji lawên Cihû-
da: Ji lawên Perets, Atayayê lawê
Ûzziyayê, lawê Zekaryayê, lawê
Amaryayê, lawê Şefatyayê, lawê
Mahalel 5 û Maaseyayê lawê
Barûkê, lawê Kol-Hozenê, lawê
Hazayayê, lawê Adayayê, lawê
Yoyarîbê, lawê Zekaryayê, lawê
Şilonîn. 6 Hemû lawên Perets, ên
li Orşelîmê rûdinin çar sed û şêst
û heyşt zilamên egîd.
7 Û lawên Benyamîn vana ne:
Sallûyê lawê Meşûllamê, lawê
Yoedê, lawê Pedayayê, lawê Ko-
layayê, lawê Maaseyayê, lawê
Îtiyelê, lawê Îşaya. 8 Û paşî wê
Gabbay, Sallay, neh sed û bîst û
heyşt. 9 Û Yowêlê lawê Zîkrî li
ser vana karmend bû[2] û Cihûdayê
lawê Hassenûan li ser bajêr yê du-
wemîn bû.
10 Ji kahînan, Yedayayê lawê
Yoyarîb, Yakîn, 11 Serayayê ser-
werê mala Xwedê, yê lawê Hîlki-
yayê, lawê Meşûllamê, lawê Tsa-
dokê, lawê Merayotê, lawê Ahîtûb
12 û birayên wî, yên ku karê malê
çêdikin heyşt sed û bîst û dudo û
Adayayê lawê Yerohamê, lawê
Pelalyayê, lawê Amtsiyê, lawê
Zekaryayê, lawê Paşhûrê, lawê
Malkiya 13 û birayên wî, serokên
malên bapîran, du sed û çel û dudo;
Amaşsayê lawê Azarelê, lawê
Ahzayê, lawê Meşîllemotê, lawê
Îmmer 14 û birayên wî, egîdên bi
metirsî, sed û bîst û heyşt. Û Zab-
dîelê lawê Haggedolîm li ser vana
karmend bû.
15 Û ji Lêwiyiyan: Şemayayê
lawê Haşşûbê, lawê Azrîkamê,
lawê Haşabyayê, lawê Bûnnî 16 û
Şabbetay û Yozabadê ku ji serekê
Lêwiyiyan in û li ser karê derve
yê mala Xwedê ne 17 û Mattan-
yayê ku bi şikiryê dest bi duayê
dike û lawê Mîkayê, lawê Zabdi-
yê, lawê Asaf e û Bakbûkyayê di
nav birayên xwe de yê duwemîn e
û Abdayê lawê Şammûayê, lawê
Galalê, lawê Yedûtûn. 18 Hemû
Lêwiyiyên ku li bajarê pîroz in du
sed û heyştê û çar.
19 Û dergevanan, Akkûb, Talmon
û birayên wan, yên ku di deriyan
de notirvaniyê dikin, sed û heftê û
dudo. 20 Û yên ku ji ber Îsraêlê,
kahînan, Lêwiyiyan, di hemû
bajarên Cihûdayê de, her kes di

1 An ji: Karmendên Perestgehê.
2 An ji: Wezîfedar bû.

mêrasa xwe de bûn. 21 Lê belê
Netînîm li Ofelê rûdiniştin û Tsîha
û Gîşpa li serê Netînîmê bûn.
22 Û ji qesîdevanên ku ji lawên
Asaf in, Ûzziyê lawê Baniyê,
lawê Haşabyayê, lawê Mattan-
yayê, lawê Mîka, li Orşelîmê li
ser karê mala Xwedê ji Lêwiyi-
yan re karmend bû. 23 Ji ber ku di
derheqê wan de emrê qiral hebû
û bona qesîdevanan roj bi rojê
mehanî hatibû peyde kirin. 24 Û
bona her karê netewê li cem qi-
ral, Petahyayê lawê Meşezabelê
ji lawên Zerahê, lawê Cihûda
ye hebû.

*Ên ku li derveyî Orşelîmê ne*

25 Û dema em bên yên ku li gun-
dan, li herêma çolwarê[1] dijîn, hin-
ekên ji lawên Cihûdayê li Kîryat-
Arba û li navçeyên wê û li Dîbon
û li navçeyên wê û li Yekabtseel
û li gundên wê 26 û li Yêşûayê û
li Moladayê, li Beyt-Peletê 27 û
li Hatsar-Şûalê û li Beer-Şebayê
û li navçeyên wê 28 û li Zîklagê
û li Mekona û li navçeyên wê
29 û li En-Rîmmonê û li Sorayê û
li Yarmûtê, 30 li Zanoahê, li Adûl-
lamê û li gundên wê, li Lakîş û li
beyarên wê, li Azeka û li navçeyên
wê, rûniştin. Û ji Beer-Şebayê heta
çemê Hînnomê qonax danîn. 31 Û
lawên Benyamîn, ji Gebayê dest-
pê kirin û li Mîkmaş û Ayyayê û li
Beytel û li navçeyên wê, 32 li Ana-
tot, Nob û Ananyayê, 33 li Hatsor,
Rama û li Gîttaîmê, 34 li Hadîd,
Tseboîm û li Neballatê, 35 li Lodê
û Onoyê, di çemê hunermendan
de rûniştin. 36 Û hinek taximên
Lêwiyiyên Cihûdayê bi Benyamîn
re yek bûn.

*Kahîn û Lêwiyiyan*

12 Û kahînên ku tevî Zerûbba-
belê lawê Şealtîel û Yêşûa
re derketine û Lêwiyiyan vana ne:
Seraya, Yêremya, Esra, 2 Amar-
ya, Mallûk, Hattûş, 3 Şekanya,
Rehûm, Meremot, 4 Îddo, Gîn-
netoy, Abiya. 5 Miyamîn, Ma-
adya, Bîlga, 6 Şemaya û Yoyarîb,
Yedaya, 7 Sallû, Amok, Hîlkiya,
Yedaya. Vana di rojên Yêşûa de li
serekên kahînan û birayên xwe yî
din bûn.
8 Û Lêwiyiyan: Yêşûa, Bînnûy,
Kadmîel, Şerebya, Cihûda û Mat-
tanyayê li ser şikiryê yî, ew bi xwe
û birayên xwe. 9 Û birayên wan,
Bakbûkya û Ûnno, li gor wezîfe-
yên xwe li hemberî wan bûn. 10 Û
Yêşû bû bavê Yoyakîm û Yoyakîm
bû bavê Elyaşîb û Elyaşîb bû bavê
Yoyada 11 û Yoyada bû bavê Yona-
tan û Yonatan bû bavê Yaddûa.
12 Û di rojên Yoyakîm de kahînên
ku serekên malên bapîran bûn
vana ne: Ji Serayayê Meraya; ji
Yêremya Hananya; 13 ji Esra

[1] Beyar.

Meşûllam; ji Amarya Yehohanan;
14 ji Mallûkî Yonatan; ji Şebanya
Ûsiv[1]; 15 ji Harîm Adna; ji Me-
rayot Helkay; 16 ji Îddo Zekarya;
ji Gînneton Meşûllam; 17 ji Abi-
ya Zîkrî; ji Mînyamîn, ji Moadya
Pîltay; 18 ji Bîlga Şammûa; ji
Şemaya Yehonatan 19 û ji Yoyarîb
Mattenay; ji Yedaya Ûzzî;
20 ji Sallay Kallay; ji Amok Eber;
21 ji Hîlkiya Haşabya; ji Yedaya
Netanel.
22 Dema em bên Lêwiyiyan, di
rojên Elyaşîb, Yoyada û Yoha-
nan û Yaddûa de, serokên malên
bapîran û kahînan, di qiraletiya
Daryûsê Farsî de hatine nivîsan-
din. 23 Lawên Lêwî, serokên
malên bapîran, heta rojên Yo-
hananê lawê Elyaşîb di pirtûka
dîrokan de hatine nivîsandin.
24 Û serekên Lêwiyiyan, Haşab-
ya, Şerebya û Yêşûayê lawê Kad-
mîel, bona ku li gor emrê Dawidê
zilamê Xwedê hemd û şikiryê
bikin, birayên wanî wekî goyîn
bi goyîn li hemberî hev bin, li
ber wan sekinîne. 25 Mattanya
û Bakbûkya, Obadya, Meşûllam,
Talmon û Akkûb dergevanên li
ber embarên deriyan disekinin
bûn. 26 Di rojên Yoyakîmê lawê
Yêşûayê, lawê Yotsadak û walî
Nehemya û nivîskar kahîn Esra
de vana hebûn.

*Pîrozkirina Sûrên Orşelîmê*

27 Û di dema pîrozkirina dîwarê
Orşelîmê de, bona ku Lêwiyi-
yan bînin Orşelîmê, bi kêfxweşî
û şikirî û sitrandinê, bi zîlan,
santûran û çenkan pîroziyê bikin,
di hemû cîhên wan de li wan ge-
riyan. 28 Û lawên qesîdevanan
ji deşta li dora Orşelîmê ye û ji
gundên Netofayiyan; 29 ji Beyt-
Gîlgalê û ji beyarên Geba û Az-
mavetê wan civandin; ji ber ku
qesîdevanan li dora Orşelîmê
li gor gundan ava kiribûn. 30 Û
kahînan û Lêwiyiyan xwe paqij
kirin û netewê û deriyan û dîwar
paqij kirin.
31 Û serokên Cihûdayê hilkişandim
ser dîwêr û du liqên mezin ên ku
şikiryê dikin û bi hengê ve dimeşin
tayîn kirim; yek li aliyê rastê ji
ser dîwar ve berbi Deriyê Sergînê
dimeşiyan 32 û ji paşî wan Hoşaya
û nîvê begên Cihûda 33 û ji paşî
wan Azarya, Esra û Meşûllam,
34 Cihûda û Benyamîn û Şemaya
û Yêremya 35 û wekî borî di destê
wan de be, hinekên ji lawên kahîn-
an: Zekaryayê lawê Yonatanê lawê
Şemayayê, lawê Mattanyayê, lawê
Mîkayayê, lawê Zakkûrê, lawê
Asaf 36 û birayên wan Şemaya û
Azarel, Mîlalay, Gîlalay, Maay, Ne-
tanel, Cihûda û Hananî, tevî haletên
mûsikî yên Dawidê zilamê Xwedê
dimeşiyan û nivîskar Esra li pêşiya
wan bû. 37 Û li cem Deriyê Kaniyê û

1 An ji: Yosef.

tam li hemberî wan, di kaşê dîwar de
ji pêlika bajarê Dawid ve hilkişiyan
û ji jorînê mala Dawid ve berbi
rojhilatê, heta Deriyê Avê meşiyan.
38 Û liqa din yên ku şikiryê dikin
û nêviya netewê û ez li paşî wan, li
ser dîwar, ji jorînê qûleya firneyan
heta dîwarê fireh 39 û ji ser De-
riyê Efrayîm û ji cem Deriyê Ke-
vin û ji cem Deriyê Masî û qûleya
Hananel û qûleya Hammea, heta
Deriyê Mîhê çûn hemberî wan û
di Deriyê Parastkeran de sekinîn.
40 Û wekî ez û tevî min nêviyê
karmendên hikûmetê li cem wan
bin, her du liqên ku şikiryê ji mala
Xwedê re dikin 41 û kahînan,
Elyakîm, Maaseya, Mînyamîn,
Mîkaya, Elyoenay, Zekarya û Ha-
nanya, di destên wan de boriyan
42 û Maaseya û Şemaya û Eleazar
û Ûzzî û Yehohanan û Malkiya û
Elam û Ezer sekinîn. Û qesîdeva-
nan, tevî nazirên xwe Yezrahya bi
dengê bilind sitranê kirin. 43 Û
wê rojê zehf qurbanan serjê kirin
û kêfxweş bûn; ji ber ku Xwedê bi
kêfxweşiyeke mezin wan kêfxweş
kiribû; pîrek û zarok jî kêfxweş
bûn û kêfxweşiya Orşelîmê ji dûr
ve hate bihîstin.
44 Wê rojê bona xezîneyan û
bona odeyan pêşkêşiyên rakirinê,
nûberan û dehekiyan, zilam ha-
tin wezîfedar kirin; da ku, li gor
beyarên bajaran, bila parên ku
ji aliyê zagonê ve bona kahînan
û Lêwiyiyan hatiye dayîn li wir
bicivînin; ji ber ku ji ber kahîn û
Lêwiyiyên ku notirvaniyê dikin
Cihûda kêfxweş dibû. 45 Û wan,
notirvaniya Xwedê û notirvaniya
teharetê girtin, qesîdevan û der-
gevanan jî li gor emrê Silêmanê
lawê Dawid wusa kirin. 46 Ji ber
ku di demên kevnar de, di rojên
Dawid û Asaf de, serokê qesîde-
vanan û qesîdeyên ji Xwedê re
hemd û şikiryê hebûn. 47 Û di
rojên Zerûbbabel de û di rojên
Nehemya de, para hemû dergevan
û qesîdevanên Îsraêlê roj bi rojê
dan û ya ku bona Lêwiyiyan e,
cuda kirin; Lêwiyiyan jî ya bona
lawên Harûn e, cuda kirin.

*Nûjeniyên dawîn yên Nehemya*

13 Wê rojê, dema netewe guh-
darî dikirin, ji pirtûka Mûsa
ve xwendin û di wê pirtûkê de
dîtin ku, bila Ammonî û Moabî
abadîn nekevin civaka Xwedê ha-
tiye nivîsandin; 2 ji ber ku bi nan
û avê nehatibûn pêrgîniya lawên
Îsraêl, lê belê bona ku li dijî wan
naletê bixwîne bi mişeyê Balam
girtibûn; lê belê Xwedayê me na-
letê wergerandibû bereketê. 3 Û
wusa bû ku, dema zagonê bihîstin,
hemûya gelên tevlihev ji Îsraêlê
ve cuda kirin.
4 Û berî vêya, kahîn Elyaşîbê
danîne ser odeyên mala Xwedayê
me, ji merivên Tobiya bû 5 û jê

re odeyek mezin amade kiribû û
pêşkêşiyên nan û gunuk û taxi-
man û dehekiya genim, xemra
nû û rûn ya li gor emir ji Lêwi-
yiyan, qesîdevanan û dergevanan
re tê dayîn, berê dixistin wir. 6 Û
dema hemû ev kar dibû, ez ne li
Orşelîmê bûm; ji ber ku di sîh û
du saliya qiral Artahşaştayê qi-
ralê Babîlê de ez çûm cem qiral û
paşî çend rojan ji qiral ve destûrê
xwestim 7 û hatim Orşelîmê û xe-
rabiya Elyaşîb, ya di hewşên mala
Xwedê de, bi çêkirina odeyekê ji
Tobiya re, kiriye fêhm kirim. 8 Û
ew bi min zehf xerab hate xuyanî
kirin û hemû lavên Tobiya ji odê
ve avêtim derve. 9 Û gotim û
odeyan paqij kirin û taximên mala
Xwedê, pêşkêşiyên nan û gunukê
dîsa anîm wir.

10 Û fêhm kirim ku, parên Lêwi-
yiyan ji wan re nehatibû dayîn û
Lêwiyî û qesîdevanên ku xizmetê
dikin, her kes reviyabûn zeviyên
xwe. 11 Û bi karmendên hikû-
metê re ketim keftûleftê û gotim:
Ma çima mala Xwedê hatiye
berdan? Û wan civandim û wan
danîm cîhên wan. 12 Û hemûya
Cihûda deheka genim û xemra nû
û rûn anîn xezîneyan. 13 Û kahîn
Şelemyayê ku li ser xezîneyan e
û nivîskar Tsadok û ji Lêwiyiyan
Pedaya xezînedar danîm[1] û Han-
anê lawê Zakkûrê lawê Mattanya
li cem wan bû; ji ber ku vana zi-
lamên dilsoz hatin hesibandin û
karên wan, ji birayên xwe re par
belavkirin bû. 14 Ji ber vê yekê
min di bîra xwe de bîne, ya Xwe-
dayê min û karên minî qenc, yên
bona mala Xwedayê min û bona
xizmetên wê çêkirime, ji holê ra-
neke[2]!

15 Di wan rojan de li Cihûdayê
dîtim ku hinek zilaman, di roja
Sebtê de, di mahserê de bi lingên
xwe tirî dieciqandin û demetan
dianîn hundir û wan li ser keran
bar dikirin û xemr û tirî û hêjîr û
bi her tewrî barî jî di roja Sebtê
de dianîn hundirê Orşelîmê û di
roja ku zexîrê difirotin de ez bi
wan pekiyam. 16 Û Sûrî li wir
rûdiniştin, wan masî û bi her tew-
rî fêkî dianîn û di roja Sebtê de,
li Orşelîmê ji lawên Cihûda re di-
firotin. 17 Û bi pêşhatiyên Cihû-
dayê re ketim keftûleftê û ji wan
re gotim: Ev karê we yî xerab, ya
bi xera kirina roja Sebtê hûn dikin
çî ye? 18 Ma bapîrên we wusa ne-
kirin û Xwedayê me hemû asîwan
neanî ser me û ser vî bajarî? Hûn
jî bi xera kirina roja Sebtê xezebê
li ser Îsraêlê zêde dikin!

19 Û wusa bû ku, dema berî Seb-
tê, li ser deriyê Orşelîmê, dake-
tina tariyê dest pêkir, emirê ku

1 An jî: Wezîfedar kirim.

2 Betal neke, an jî: Paqij neke.

bona derî bên girtin dam û heta ku
paşî Sebtê bila neyên vekirin emir
dam û bona roja Sebtê bar nekeve
hundir, ji xulamên xwe hinekan
danîm ber deriyan. 20 Û bazir-
gan û yên her celebên pertalan
difiroşin carekî du carî li derveyî
Orşelîmê şevê borandin. 21 Û bi
wan re xeyidîm û ji wan re gotim:
Çima hûn li ber dîwêr şevê di-
borînin? Ger carekî din hûn wusa
bikin, ez ê dest bavêjim wę[1]! Û
paşî wê demê roja Sebtê nehatin.
22 Û ji Lêwiyiyan re, bi gotina:
Bona pîroz kirina roja Sebtê, bila
xwe paqij bikin û werin û li ben-
da deriyan bin! emir dam. Bona
min vêya jî di bîra xwe de bîne,
ya Xwedayê min û li gor zêdeyiya
xêra xwe min biparêze!
23 Û di wan rojan de Cihûdên ku
jinên Aşdodî û Ammonî û Moabî
girtine dîtim 24 û nêviyê zarokên
wan zimanê Aşdodê digotin û ni-
karîbûn ku zimanê Cihûdî bibêjin.
25 Û bi wan re ketim keftûleftê û
ji wan re naletê kirim û li hinekan
xistim û porên wan lîçikandim û
bona mafê Xwedê ji wan re sondê
dam xwarin û ji wan re gotim: Hûn
ê qîzên xwe nedin lawên wan û ji
lawên xwe û ji xwe re ji qîzên wan
nestînin! 26 Ma qiralê Îsraêlê Silê-
man bi van tiştan sûcê nekir? Û di
nava gellekên netewan de mîna wî
qiral tunebû û evînê Xwedê bû û
Xwedê wî li ser hemûya Îsraêlê kir
qiral; jinên biyan heta ji wî re jî sûc
dan kirin. 27 Ma qey em rû bidin ki-
rina we ya vê xerabiya mezin ya ku
bona hûn ji Xwedayê me re xayînti-
yê bikin, jinên biyan distînin?
28 Û ji lawên Yoyadayê lawê
Serokkahîn Elyaşîb, yek zavayê
Sanballatê Horonî bû; ji ber vê
yekê wî jî ji cem xwe qewirandim.
29 Ya Xwedayê min, wan di bîra
xwe de bîne, ji ber ku kahîntiyê û
bi kahîtiyê û peymana Lêwiyiyan
xera kirin!
30 Û wan ji hemû biyanan paqij
kirim 31 û di wextên eşkere de
bona pêşkêşiya êzing û nûberan,
wekî her kes di karê xwe de bin
bona kahîn û Lêwiyiyan wezî-
feyan tayîn kirim. Ya Xwedayê
min, min bi qenciyê di bîra xwe
de bîne!

[1] Li dijî we dest bavêjim darê zorê!

# ESTER

*Pêşgotin*

Bûyerên di pirtûka Esterê de derbas dibin, B.Z. di sedsala 5'an de li qesra zivistanê ya Ahaşveroşê qiralê Farisan de derbas dibin. Di navenda bûyeran de qiralîça Cihûdan ya ku navê wê Ester e heye. Bi saya cesareta qiralîçe Ester, dibe sedema xelasiya gelê Îsraêlê, ji pêşniyarên tevkuştinek mezin ya neyarên Îsraêlê. Paşê merivê wê Mordekay, dibe serokwezîrê qiral. Pirtûk bi giştî qala wate û bûyerên di bingeha Pûrîma ku cejna Cihûdan e de tîne ziman.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:23 | Ester dibe qiralîçe |
| 3:1-5:14 | Pêşniyarên Haman yên xerab |
| 6:1-7:10 | Haman tête kuştin |
| 8:1-10:33 | Cihûdan neyarên xwe mexlûb dikin |

*Şahiyên Ahaşveroş*

1 Û wusa bû ku, di rojên
Ahaşveroş de – Ahaşveroşê
ku ji Hîndê heta welatê Hebeşê
li ser sed û bîst û heft wilayetî
qiraletiyê dikir ev bû –, 2 qi-
ral Ahaşveroş, di wan rojên ku
di textê qiraletiyê ya ku li qesra
Şûşanê de ye rûdinişt, 3 di sê sa-
liya qiraletiya xwe de ziyafetekê
ji hemû serok û qûlên xwe re da
û dema leşkerê Fars û Medyayê û
serok û pêşhatiyên wilayetê li ber
çavê wî bûn, 4 gellek rojan, sed û
heyştê roj, dewlemendiya mezin-
tiya qiraletiya xwe û mezintiya
rewnaqiya ku dibiriqe nîşan da.
5 Û dema ew roj tijî bûn, qiral ji
biçûk heta mezin, ji hemû nete-
weya ku li qesra Şûşanêne re, di
hewşa bexçê qesra qiral de heft roj
ziyafetê da. 6 Perdeyen sipî, kesk
û lacîwerd ên ku bi kitana tenik
û qeytanên erxewanî bi xelekên
zîv û sitûnên mermer ve girêdayî
hebûn; livînên li ser raxêrên mer-
mer, ên sor û sipî û zer û reş in, ji
zêr û zîv bûn. 7 Û ji wan re xemra
qiral, bi zêdeyiyek liyaqî comer-
diya qiral e, di feraxên zêrînî de
pêşkêş kirin û ferax ji hev cihêtir
bûn. 8 Û vexwarina wan li gor

emir bû; yê ku zorê bide tune
bû; ji ber ku qiral, bona her kes li
gor dilê xwe çêbikin, bi vî awayî
emir dabû hemû karmendên mala
xwe.
9 Û qiralîçe Vaştî jî di mala qiral
Ahaşveroş de ziyafetê da pîre-
kan. 10 Di roja heftan de, dema
dilê qiral bi xemrê bi kêf bû, bona
xweşikya qiralîçe Vaştî nîşanî ne-
tewan û serokan bide, ji bo wê bi
taca wê ya qiraletiyê bînin ber qi-
ral, 11 ji heft axayên qîzan ên ku
li ber qiral Ahaşveroş xizmetê di-
kin re; ji Mehûman re, Bîztay re,
Harbona re, Bîgtay re û ji Abag-
tay re, Zetar re û Karkas re emir
kir; ji ber ku nêrîna wê xweşik bû.
12 Lê belê qiralîçe Vaştî, nexwest
ku bi emrê qiral, ya bi navdîtiya
axayên qîzan e were, ji ber vê
yekê qiral zehf hêrs bû û hêrsa wî
di dilê wî de pê ket.
13 Û qiral, ji zilamên bi zanyar
yên ku bi wextan dizanin re – ji
ber, bona yên ku bi zagon û da-
raziyên dizanin, adeta qiral wusa
bû 14 û Karşena, Şetar, Admata,
Tarşîş, Meres, Marsena û Memû-
kan heft serokên Fars û Medyayê,
ên ku herî nêzîkî wî ye bûn û yên
ku wecê qiral dibînin û di qirale-
tiyê de li serî rûdinin bûn – got:
15 Ji ber ku li gor emrê qiral
Ahaşveroş ya bi navdîtiya axayên
qîza ne nekiriye, ka li gor zagonê
em ê çi bi qiralîçe Vaştî re bikin?
16 Û Memûkan li ber qiral û sero-
kan gotin: Qiralîçe Vaştî ne tenê li
dijî qiral, lê belê li dijî hemû sero-
kan û li dijî hemû neteweyên ku li
giştikên welatên qiral Ahaşveroş
sûc kiriye. 17 Ji ber ku dê ev karê
qiralîçê bigihêje guhên hemû pîre-
kan û dema ew: Qiral Ahaşveroş
emir da ku qiralîçe Vaştî bînin ber
wî û ew nehat bibêjin, dê di çavên
pîrekan de mêrên wan biçûk bike-
vin! 18 Û tiştên ku îroj qiralîçe ki-
rine, dema dotmîrên Fars û Medya
bibîhizin, dê ji hemû mîrzayên
qiral re bibêjin. Û dê bi vî awayî
zehf heqaret û hêrs bibe. 19 Ger
ji qiral re qenc bête xuyanî kirin,
bila ji wî emirekî qiral derkeve û
bi gotina: Êdî dê Vaştî neyê ber
qiral Ahaşveroş di nava zagonên
Farsiyan û Mediyan de bête nivî-
sandin û neyê guhertin û bila qiral
qiralîçetiya wê bide yekê jê hîn jî
qenctir e. 20 Û emrê ku dê qiral
bide, dema di hemûya qiraletiya
wî de, ji ber ku ew mezin e; bête
bang kirin, dê ji biçûk heta mezin
hemû pîrek, ji zilamên xwe re bi
hurmet bin! 21 Û ev gotin di ça-
vên qiral û serokan de qenc hate
xuyanî kirin û qiral, li gor gotina
Memûkan kir 22 û bona her mêr di
mala xwe de serwer be û li gor zi-
manê netewa xwe bibêje, ji hemû
wilayetên qiral re, li gor nivîsa wê
ji her wilayetî re, li gor zimanê wê
ji her netewê re name şandin.

*Ester dibe Qiralîçe*

2 Paşî van tiştan, dema hêrsa
qiral Ahaşveroş aş bû, Vaştî
û karê ku ew dike û biryara ku li
dijî wê hatiye dayîn di bîra xwe
de anî. 2 Û xulamên ku xizmetê
ji qiral re dikin gotin: Bila bona
qiral, li qîzên ku lênêrîna wan
xweşik û neçûne mêr bên gerîn
3 û bila qiral ji hemû wilayetên
xwe re karmendan wezîfedar bike
û hemû qîzên ciwan ên lênêrînên
wan xweşik in û neçûne mêr, li
qesra Şûşanê, mala pîrekan, di bin
destê Hegayê axayê qîzên qiral û
notirvanê pîrekan de bicivînin û
tiştên ku bona paqijiya wan hew-
ce ye, bila ji wan re bên dayîn 4 û
qîza ku di çavê qiral de baş bête
xuyanî kirin bila li dêvila Vaştî
bibe qiralîçe. Û ev gotin di çavê
qiral de qenc hate xuyanî kirin û
wusa kir.
5 Li qesra Şûşanê Cihûdek hebû
û navê wî Mordekayê Benyamîni-
yê lawê Yaîrê, lawê Şîmeiyê, lawê
Kîş bû 6 û ev zilama tevî sirgûnên
ku bi qiralê Cihûdayê Yekonya ji
Orşelîmê hatine ajotin hatibû sirgûn
kirin, Nebûkadnetsarê qiralê Babîlê
wan ajotibû. 7 Û wî qîza apê xwe
Hadassayê, Esterê xwedî kiribû; ji
ber ku dayik û bavê wê tune bûn û
bejnûbala wê xweşik û lênihêrtina
wê qenc bû û dema dayik û bavê
wê mirin, Mordekay wê ji xwe re
wekî qîza xwe girt cem xwe.
8 Û wusa bû ku, dema gotin û
emrê qiral hate bihîstin û gellek
qîz li qesra Şûşanê, di bin des-
tê Hegay de civiyan, Esterê jî
bi mala qiral ve hate dayîn, bin
destê Hegay. 9 Û qîzik di çavê wî
zilamî de qenc hate xuyanî kirin
û di çavê wî de xêrê dît û tiştên
ku bona paqijiya wê û parên wê
û heft qîzikên ku ji mala qiral ve
bona ku bidin wê munasib hatiye
dîtin, hema dan wê û wê û qîzikên
wê li cîhê herî xweş yê mala pîre-
kan bi cîh kirin. 10 Ester netewa
xwe û merivê xwe negotibû; ji ber
ku Mordekay, bona ku neghîne jê
re gotibû. 11 Û Mordekay bona
ku, ka Eşter di çi halî de ye û dê
çi bi wê bikin fêhm bike her roj li
ber hewşa mala pîrekan digeriya.
12 Paşî ku li gor ûsila pîrekan,
donzdeh meh ji her qîzikê re ki-
rin, dema dora wê ya ketina cem
qiral Ahaşveroş hat, – ji ber ku ro-
jên wanî paqijiyê şeş meh bi rûnê
murê û şeş meh bi tiştên ku bona
paqijiya pîrekan tiştên hewce di-
kin re, bi vî awayî temam dibû
– 13 û qîzik bi vî awayî diket cem
qiral; bona ku ji mala pîrekan heta
mala qiral pê re here her xwestekê
wê jê re dihat dayîn. 14 Êvarî diçû
û sibehê vedigeriya mala pîrekan
ya duwemîn, bin destê Şaaşgazê
notirvanê cariyeyan û axayê
qîzan, lê gava qiral ne jê xweş be
û bi navê wê neyê bang kirin ca-

rekî din nediket cem qiral. 15 Û
Estera ku Mordekay ji xwe re bi
qîzitî girtiye û qîza apê wî Abîhaîl
e, dema dora wê ya ketina cem qi-
ral hat, xeynî tiştên ku notirvanê
pîrekan, axayê qîzên qiral Hegay
gotiye tiştekî nexwest. Û di çavên
hemûyên ku wê dîtine de, Ester
xêrê dît.
16 Û Esterê di meha dehemîn
a sala heftan ya qiraletiya qiral
Ahaşveroş de, ji qiral re birin
mala qiral; ew meha Tebetê ye.
17 Û qiral ji hemû pîrekan zêdetir
ji Esterê hez kir û li ber wî ji hemû
qîzikan zêdetir saye û xêrê dît û
taca qiralîçetiyê danî serê wê û li
dêvila Vaştî wê kir qiralîçe. 18 Û
qiral ji hemû serok û qûlên xwe re
ziyafetek mezin, ziyafeta Esterê
da û aramiyê da wilayetên wan û
li gor comerdiya qiral xelatan da.

*Mordekay jiyana Qiral diparêze*

19 Û dema cara duwemîn qîzik
civiyan, Mordekay di deriyê qiral
de rûniştîbû. 20 Ester, wekî Mor-
dekay emir dabûyê, hîn netewe û
merivê xwe negîhandibû; ji ber ku
Ester mîna dema ku li cem Morde-
kay dihat xwedî kirin, bi emrê wî
dikir. 21 Di wan rojan de hîn Mor-
dekay di deriyê qiral de rûdinişt,
du axayên qîzên qiral ên notirvanê
şemûgê bûn, Bîgtan û Tereş hêrs
bûn û xwestin ku dest bavêjin qiral
Ahaşveroş. 22 Û ev kar ji Morde-
kay re malûm bû û ji qiralîçe Ester
re gîhand û Ester, bi navê Morde-
kay ji qiral re got. 23 Û dema lê-
kolîn hate kirin û kar bi vî awayî
hate dîtin, her du jî bi dar ve hatin
daliqandin û li ber qiral, di pirtûka
dîrokan de hate nivîsandin.

*Pêşniyarên Haman yên xerab*

3 Paşî van tiştan, qiral Ahaşveroş
Hamanê Agagiyê lawê Ham-
medatan mezin kir û wî bilind kir
û kursiya wî, danî ser hemû se-
rokên ku li cem wî ne. 2 Û hemû
qûlên qiral, ên ku di deriyê qiral
de ne ji Haman re xwe xwar diki-
rin û li ber wî xwe davêtin erdê; ji
ber ku di derheqê wî de qiral bi vî
awayî emir dabû. Lê belê Morde-
kay xwar nebû û xwe neavêt erdê.
3 Û qûlên qiral, ên ku di deriyê
qiral de ne ji Mordekay re gotin:
Ma çima ji emrê qiral wêdetir di-
here? 4 Û wusa bû, çawa ku her
roj jê re dibêjin lê belê ew guh-
darî nake, bona ku hela dê gotinên
Mordekay bisekinin an nesekinin
bibînin ji Haman re gîhandin; ji
ber ku Cihûdîbûna wî, jê re hatibû
gîhandin. 5 Û Haman dît ku Mor-
dekay xwar nabe û li ber wî xwe
navêje erdê û Haman bi hêrsê ve
tijî bû. 6 Lê belê tenê dest avêtina
Mordekay jê re biçûk hate xuyanî
kirin; ji ber ku netewa Mordekay
jê re gîhandîbûn û Haman dixwest
ku di hemûya welatê Ahaşveroş

de hemûyên Cihûdiyan, netewa Mordekay helaq bike.

7 Di donzdeh saliya qiral Ahaşveroş de, di meha yekemîn de, di meha Nîsanê de, her roj û heta meha donzdehan, meha Adarê her meh li ber Haman pûr, yanê vijagê avêtin. 8 Û Haman ji qiral Ahaşveroş re got: Neteweyek dinî ya di nava hemû neteweyên li wilayetê te de belav bûyiye heye û zagonên wan ji her neteweyên din ve cudatir in û bi zagonê qiral ve nagirin û wan bi halê xwe ve berdan ji qiral re hewce nake! 9 Ger ji qiral re qenc bête xuya kirin bila bona ku wan tune bikin bête nivîsandin û bona ku bibin xezîneya qiral, ez ê deh hezar talant[1] zîvî biwezînim û bidim destê yên ku karê qiral dikin. 10 Û qiral gustîlkê ji destê xwe ve derxist û wê da destê neyarê Cihûdiyan, Hamanê Agagî yê lawê Hammedatan. 11 Û qiral ji Haman re got: Zîv û netewe ji te re hatiye dayîn, di derheqê wê de li gor ya ku di çavê te de qenc e bike!

12 Û di meha yekemîn de, di roja sêzdehan de katibên[2] qiral hatin bang kirin û li gor her tiştê ku Haman emir kir, ji wekîlên qiral re û ji her waliyên ku li ser wilayetan e re û ji her serokên neteweyan re û li gor nivîsa wê ji her wilayetî re û li gor zimanê wê ji her neteweyî re hate nivîsandin; bi navê qiral Ahaşveroş ve hate nivîsandin û bi gustîlka qiral ve hate mor kirin. 13 Û di meha donzdehan de, di meha Adarê de, di roja sêzdehan de, bona ku hemû Cihûdiyan, ciwanan û zilamên kal, zarokên biçûk û pîrekan, di rojekê de helaq bikin, bukujin û tune bikin û malên wan talan bikin, ji hemû wilayetên qiral re, bi destê şandiyan re name hatin şandin. 14 Bona ku ji bo wê rojê amade bibin, sûreta nivîsê li her wilayetê wekî fermanê bête belav kirin, ji hemû neteweyan re hate bang kirin. 15 Şandî bi emrê qiral ve bi lezî derketin rê, di qesra Şûşanê de jî ferman hate derxistin. Û qiral û Haman rûniştin ku vexwin; lê belê bajarê Şûşanê di nava şaşitiyê de bû.

*Mordekay alîkariyê ji Ester dixwaze*

4 Û dema Mordekay hemû tiştên ku dibin bihîst, kincê xwe çirand û xwelî û cilikê[3] li xwe pêçand û derket navenda bajêr û bi qêrînek bi jan û bilind qêriya 2 û hat heta ber deriyê qiral; ji ber ku tu kes bi pertal pêçandinê nikaribû ji deriyê qiral ve derbasî hundir bibûya. 3 Û li her wilayetî li her cihê ku gotin û fermana qiral gîhaştiye,

[1] Li rasteka menan binêrin.
[2] Nivîsyar.
[3] Yanê çûl.

di nava Cihûdan de şîna mezin û
rojî û qêrîn û li xwe xistin hebûn û
gellekên ji wan li ser pertal û xwe-
liyê raketin.
4 Û qîzên Ester û axayên qîzan
hatin û vê yekê agahî wê kirin
û qiralîçe zehf kesirî û bona ku
li Mordekay bikin û pertala ser
wî jê bikin kinc şand; lê belê wî
wan qebûl nekir. 5 Û Ester, bangî
axayekî qîzan, yê ku qiral wî dabû
xizmeta wê, Hatak kir û emir da
wî ku bila here cem Mordekay
û fêhm bike, ka ev çî ye û çima
çêbûye. 6 Û Hatak hilkişiya qada
bajêr ya li ber deriyê qiral e, cem
Mordekay. 7 Û Mordekay her
tiştê ku hatiye serê wî û bitûmiya
hejmara zîvê ku bona Cihûdiyan
tune bikin, Haman wad kiriye ku
dê bide xezîneya qiral jê re got.
8 Û sûreta nivîsa fermanê ya ku li
Şûşanê belav bûyiye dayê ku, bila
nîşanî Esterê bide û jê re bibêje û
emir bide ku bila bikeve cem qiral
û jê sayê bixwaze û bona netewa
xwe li ber wî bigere.
9 Û Hatak hat û gotinên Morde-
kay ji Esterê re gîhand. 10 Û Ester
bi Hatak re axifî û agahiyek wusa
ji Mordekay re şand. 11 Hemû
qûlên qiral û neteweyên wilayetên
qiral dizanin ku dixwaze bila mêr
be an jî jin be, heta ku bangî cem
qiral, hewşa navîn nebin, her kî
bikevê, di derheqê wî de zagonek
wusa heye ku, xeyni zilamê ku
bona sax bimîne qiral çoya xwe
yî zêrîn dirêjî wî kiriye, giştik dê
werin kuştin û sîh roj e, bona ku
bikevim cem qiral bangî min ne-
kirin! 12 Û gotinên Esterê gîhan-
din Mordekay.
13 Û Mordekay, bona ku vê ber-
sivê ji Esterê re bibin got: Nebêje
qey ji ber ku tu li mala qiral î,
tuyê ji hemû Cihûdiyên din zê-
detir xelas bibe. 14 Ji ber ku, ger
di vî wextî de tu bitûmî hiş bibe,
dê ji Cihûdan re alîkarî û xelasî
ji cîhekî din derkeve, lê belê tu û
mala bavê te dê tune bibin û ma kî
pê dizane, dibe ku tu bona demekî
ûsa gîhaştibe qiraletiyê? 15 Û Es-
ter xwest ku vê bersivê ji Mor-
dekay re bibin: 16 Here û hemû
Cihûdiyên ku li Şûşanê amade ne,
bicivîne û bona min rojiyê bigirin
û bi şev û roj, sê rojî nexwin û ve-
nexwin; ez û qîzên xwe jî wusa
rojiyê bigirin û bi vî awayî çawa
ku ne li gor emir e, ez ê herim
cem qiral û ger ez bimirim, bila
bimirim! 17 Û Mordekay çû û li
gor her tiştê ku Ester jê re emir
dayiye kir.

*Ester xwesteka xwe digehîne Qiral*

5 Û roja sêwemîn wusa bû ku,
Ester kincê qiralîçeyê li xwe kir
û di hewşa navîn ya mala qiral de
li hemberî mala qiral sekinî û qiral,
di mala qiral de li ser texta xwe yî
qiraletiyê de rûniştîbû. 2 Û wusa

bû ku dema qiral, qiralîçe Ester li hewşê sekinandî dît, di çavê wî de xêrê dît û qiral çoyê zêrîn ya ku di destê wî de ye dirêjî Esterê kir. Û Ester nêzîk hat û destê xwe di serê çoyê da. 3 Û qiral jê re got: Çiyî te heye qiralîçe Ester? Û xwesteka te çî ye? Heta nêviyê welat dê ji te re bête dayîn! 4 Û Ester got: Ger ji qiral re qenc bête xuya kirin, bila qiral îroj tevî Haman were ziyafeta ku bona wî çêkirime.

5 Û qiral got: Bona gotina Ester çêbikim, bi lezî Haman bînin. Û qiral û Haman hatin ziyafeta ku Ester çêkiriye. 6 Û dema xemr dihat vexwarin qiral ji Esterê re got: Daxwaziya te çî ye? Û dê ji te re bête dayîn û xwesteka te çî ye? Dê heta nêviyê welat bête çêkirin! 7 Û Ester bersivê da û got: Daxwazî û xwesteka min ev e ku, 8 ger di çavê qiral de xêrê[1] dîtibim û dayîna daxwaziya min û li cîh anîna xwesteka min ji qiral re qenc bête xuyanî kirin, bila qiral û Haman werin ziyafeta ku bona wan ez ê bikim û ez ê gotina qiral sibê bikim.

*Hêrsa Haman*

9 Û Haman wê rojê bi kêfxweşî û dilekî qenc derket; lê belê dema Haman dît ku Mordekay di deriyê qiral de ranabe ser pêlan û bona wî xwe tev nade, li dijî Mordekay bi hêrsê ve tijî bû. 10 Lê belê Haman bi xwe girt û hat mala xwe û şand û hevalên xwe û pîreka xwe Zereşê dan anîn. 11 Û Haman, mezintiya dewlemendiya xwe û zêdeyiya lawên xwe û hemû tiştan; ka qiral wî çawa mezin kiriye û qiral wî li ser serok û qûlên xwe bilind kiriye, ji wan re got. 12 Û Haman got: Belê, qiralîçe Ester di ziyafeta ku çêkiribû, nehişt bi qiral re xeynî min tu kes bikeve û sibê jî ez ji aliyê wê ve tevî qiral dawetkirî me! 13 Lê belê ez, her ku Mordekayê Cihûdî di deriyê qiral de rûniştî dibînim, bona min tu qîmeta vêya nîne! 14 Û pîreka wî Zereş û hemû hevalên wî jê re gotin: Bila di bilindahiya pêncî gezî[2] de dareki dardakirinê bête çêkirin û sibehê ji qiral re bêje ku bila Mordekay li ser wê ve bête daliqandin û tevî qiral, bi kêfxweşiyê here ziyafetê! Û ev tişt di çavê Haman de qenc hate xuyanî kirin û darê dardakirinê da çêkirin.

*Xawêndana Mordekay*

6 Wê şevê xewa qiral tewirîn û xwest ku pirtûka dîrokan, ya bîrnameyan bînin û ew li ber qiral ve hatin xwendin. 2 Û nivîsandî hate dîtin ku, ji du axayê qîzên qiral ên ji notirvanên şêmûgê ne.

1 Lutif. say. qenci. an ji: Kerem.

2 Li rasteka menan binêrin.

Di derheqê Bîgtana û Tereş de, ên ku xwestîbûn dest bavêjin qiral Ahaşveroş, Mordekay agahiyê gîhandibû. 3 Û qiral got: Ma ji ber vê yekê çi şeref û giramî dan Mordekay? Û xulamên qiral ên ku xizmetê dikirin gotin: Jê re tu tiştek nehat çêkirin. 4 Û qiral got: Li hewşê kî heye? Û Haman, bona ji qiral re bibêje ku, bila Mordekay li darê dardakirinê ya ku bona wî amade kiriye daliqînin, hatibû hewşa derve ya mala qiral. 5 Û xulamên qiral jê re gotin: A vay, Haman li hewşê sekiniye. Û qiral got: Bila were hundir! 6 Û Haman hate hundir. Û qiral jê re got: Ma ji zilamê qiral dixwaze ku şerefê bide wî, dê çi bête kirin? Û Haman ji hundirê xwe ve got: Ma ji min zêdetir qiral dixwaze ku şerefê bide kî? 7 Û Haman ji qiral re got: Bila bona zilamê ku qiral dixwaze şerefê bide wî, 8 kincê qiraletiyê yê qiral li xwe dike û hespê ku qiral lê siwar bûye û taca qiraletiyê ya ku danîne serê wî bila bînin 9 û bila kinc û hespê, bi seretayî bidin destê serokekî ku xizmetê ji qiral re dike re û bila li zilamê ku qiral dixwaze şerefê bidê bikin û wî li ser hesp siwar bikin û di kuçeyên bajêr de bigerînin û li ber wî bi gotina: Ji zilamê ku qiral dixwaze şerefê bidê re, bi vî awayî tê kirin! biqêrin. 10 Û qiral ji Haman re got: Mîna ku te got, hema kinc û hespê rahêle û li Mordekayê Cihûdî, ê ku li deriyê qiral rûdine wusa bike; bila ji tiştên ku te gotine, qet kêm nebe. 11 Û Haman kinc û hespê rahişt û li Mordekay kir û wî li hespê siwar kir û di kuçeyên bajêr de gerand û li ber wî, bi gotina: Ji zilamê ku qiral dixwaze şerefê bidê, bi vî awayî tê kirin! qêriya. 12 Û Mordekay vegeriya deriyê qiral. Û Haman bi şîn û serî girtî bi lezî çû mala xwe. 13 Û Haman hemû tiştên ku hatine serî ji jina xwe Zereşê re û ji hemû hevalên xwe re got. Û zilamên wî yên bi zanyar û jina wî Zereş jê re gotin: Ger Mordekayê ku te dest pêkiriye û tu li ber wî dikeve, ji nîjada Cihûda be, dê quweta te têra wî neke, lê tuyê muheqeq li ber wî bikeve. 14 Hîn ew pê re diaxifîn axayên qîzan yên qiral hatin û bi lezî Haman birin ziyafeta ku Ester çêkiriye.

*Mirina Haman*

7 Û qiral û Haman hatin ziyafeta qiralîçe Ester. 2 Û di roja duwem de, dema xemr dihat vexwarin qiral dîsa ji Esterê re got: Daxwaziya te çî ye qiralîçe Ester? Û dê ji te re bête dayîn û xwesteka te çî ye? Heta nêviyê welat dê ji te re bête çêkirin! 3 Û qiralîçe Ester bersivê da û jê re got: Ya qiral, ger di çavê te de xêrê dîtibim û ger ji qiral re qenc bête xuyanî kirin,

bila li ser daxwaziya min canê
min û li ser xwesteka min nete-
weya min ji min re bête borîn! 4
Ji ber ku ez û netewa min, bona
ku bên helaq kirin, kuştin û tune
kirin hatin firotin. Û ger em wekî
dîl û cariyan bihatana firotan, ez
ê bêdeng bimama, lê belê neyar
nikaribû berdêla xesara qiral bi-
daya! 5 Û qiral Ahaşveroş axifî
û ji qiralîçe Ester re got: Zilamê
bona ku vî karî bike rabûye kî ye
û ka li ku derê ye? 6 Û Ester got:
Neyarek û dijminek, ev xerab Ha-
man! Û Haman li ber qiral û qi-
ralîçê ket toqînê. 7 Û qiral bi hêrsa
xwe, ji ziyafeta xemrê rabû û der-
ket bexçeyê qesrê û Haman, bona
ku ji qiralîçe Esterê parsa jiyana
xwe bike, li ser pêlan sekinî; ji
ber, didît ku ji aliyê qiral ve li dijî
wî biryara xerabiyê hatiye dayîn.
8 Û qiral ji bexçeyê qesrê vegeriya
cîhê ziyafeta xemrê û Haman xwe
avêtibû ser sedira ku Ester li ser
rûniştîbû. Û qiral got: Ma li malê,
heta li cem min jî dê zorê bide qi-
ralîçeyê? Û dema ev gotin ji devê
qiral derket, wecê Haman nuxu-
mandin. 9 Û ji yekî axayên qîzan
ên li ber qiral in re, ji Harbon re
got: Him a vay, darê dardakirinê ê
di bilindahiya pêncî gezî de yî û yê
ku Haman bona Mordekayê bona
qiral qenciyê gotiye daliqîne çêki-
riye, li ber mala Haman disekine.
Û qiral got: Wî li ser wê daliqînin!
10 Û li ser darê dardakirinê yê ku
bona Mordekay çêkiribû, Haman
daliqandin. Û hêrsa qiral aş bû.

*Cihûyan Xelas dibin*

8 Wê rojê qiral Ahaşveroş, mala
Hamanê neyarê Cihûdiyan e
da destê qiralîçe Ester. Û Mor-
dekay hat ber qiral; ji ber Ester
jê re gîhandibû ku ew çiyî wê ye.
2 Û qiral gustîlka xwe yî ji Haman
ve şunda stendiye derxist û wê da
Mordekay û Ester Mordekay danî
ser mala Haman.
3 Û li ber qiral Ester dîsa got û
ket ber lingên wî û giriya û bona
duzena ku Hamanê Agagî li dijî
Cihûdiyan daniye û xerabiya wî
ji daraziyê ve bixîne li ber wî ge-
riya. 4 Û qiral çoya zêrîn direjî
Ester kir. Û Ester rabû ser pêlan
û li ber qiral sekinî. 5 Û got: Ger
ji qiral re qenc bête xuya kirin û
li ber wî xêrê dîtibim û kar li ber
qiral rast bête xuyanî kirin û ez di
çavê wî de qenc bim, bila bona
xera kirina nameyên ku Hamanê
Agagî lawê Hammedatan rêz ki-
riye û qiral, bona Cihûdiyên ku li
hemû wilayetan e bên tune kirin
nivîsandiye, bête nivîsandin; 6 ji
ber ku ma ez ê çawa baldirêjiya
tiştên ku werin serê netewa xwe
bikim? Û ez ê çawa di ber dîtina
helaqbûna merivên xwe de bi-
dim? 7 Û qiral Ahaşveroş ji qi-
ralîçe Ester û Mordekayê Cihûdî

re got: A vay, mala Haman dam
Ester û wî di darê dardakirinê de
daliqandin, ji ber ku dest avêtibû
ser Cihûdiyan. 8 Çawa ku, tu kes
nikare nivîsa bi navê qiral hatiye
nivîsandin û bi gustîlka wî ve ha-
tiye mor kirin xera bike, hûn li gor
ji ya di çavê we de qenc e bi navê
qiral ji Cihûdiyan re binivîsînin û
bi gustîlka qiral ve mor bikin!
9 Û wê gavê di meha sêwem de,
di meha Sîvan de, di bîst û sisi-
yan de katibên qiral hatin bang
kirin û li gor her tiştên ku Mor-
dekay emir daye, ji Cihûdiyan
re û ji wekîlên qiral re û ji Hîndê
heta Hebeşê walî û serokên sed û
bîst û heft wilayetî re, li gor ni-
vîsa wê ji her wilayetî re û li gor
zimanê wê ji her netewê re û li
gor nivîs û zimanên wan ji Cihû-
diyan re hate nivîsandin. 10 Û bi
navê qiral Ahaşveroş ve nivîsand
û bi gustîlka qiral mor kir û na-
meyan bi destên şandiyên siwar,
ên ku li hespên lez siwar bûyîne
ve şandin[1]. 11 Di van nameyan
de qiral, ji Cihûdiyên ku li her
bajarî ne re, destûra di rojekê de,
di meha donzdehan de, di roja
sêzdehan ya meha Adarê de, li
hemû wilayetên qiral Ahaşveroş
de 12 civandinê û bona canê xwe
sekinê, helaq kirin, kuştin û tune
kirin û talan kirina malên gelên
wilayetê an jî neteweya ku êrîşî
wan, pîrekên wan û zarokên wan
bikin, dan. 13 Bona ku li her wi-
layetî bi fermanî bête belav kirin
û Cihûd wê rojê, bona ku tola
xwe ji neyarên xwe ve bistînin,
sûreta nivîsê ji hemû neteweyan
re hate bang kirin. 14 Û şandiyên
siwarên ku li hespên berzîn yên
di xizmeta qiral de tên şuxulandin
siwar bûyîne, bi emrê qiral kirin
û hema bi lezî derketin rê; di
qesra Şûşanê de jî fermanek hate
derxistin.
15 Û Mordekay, bi kincê qiral yê
lacîwerd û sipî û bi taca zêrîn ya
mezin û bi cubba ji kitana zirav
û erxewanî, ji ber qiral derket û
bajarê Şûşanê qêriya û kêfxweş
bû. 16 Di nava Cihûdiyan de ro-
nahî û kêfxweşî û dilşadî û şeref
hebû. 17 Û li her wilayetî û li
her bajarî, gotin û fermana qiral
her gîhaştibe ku derê, li wir bona
Cihûdiyan kêfxweşî û firehî, zi-
yafet û roja qenc bû. Û di nava
neteweyên welêt de pirr kes bûn
Cihûd; ji ber ku tirsa Cihûdiyan
ketibû ser wan.

*Serfiraziya Cihûdan*

9 Û di meha donzdehan de, di
meha Adarê de, di roja wê yî
sêzdehan de, dema wexta li cîh
anîna gotin û fermana qiral hat, di

[1] An jî: Ên ku li hespên lez, qantir, deweyên xwurt ên ciwan siwar bûyîne şandin.

roja ku neyarên Cihûdiyan hêvî
dikirin ku wan mexlûb bikin de;
lê belê kar şunda hate wergeran-
din, Cihûdiyan yên ku ji xwe di-
kerihiyan mexlûb kirin. 2 Cihûdi-
yan bona ku dest bavêjin ser yên
ku li xesara wan digerin, di ba-
jarên xwe de, li hemû wilayetên
qiral Ahaşveroş de civiyan û tu
kes hêz neanîn ku li ber wan bi-
sekinin; ji ber ku tirsa wan ketibû
ser hemû neteweyan. 3 Û hemû
serokên wilayetan û wekîlên qi-
ral û waliyan û yên ku karê qiral
dikirin alîkariyê bi Cihûdiyan re
kirin; bona ji ber Mordekay tirs
ketibû ser wan. 4 Ji ber ku Mor-
dekay di mala qiral de mezin bû
û li hemû wilayetan nav û dengê
wî belav bû û ev zilam Morde-
kay her ku diçû mezin dibû. 5 Û
Cihûdiyan hemû neyarên xwe ji
şûr ve derbas kirin û kuştin û ji
yên ku ji wan dikerihin re li gor
daxwaziya xwe kirin. 6 Û Cihû-
diyan li qesra Şûşanê pênc sed
kesî kuştin û tune kirin. 7 Û deh
lawên Hamanê lawê Hamme-
datanê ku neyarê Cihûdiyan bû,
8 Parşandata û Dalfon û Aspata
9 û Porata û Adalya û Arîdata
10 û Parmaşta û Arîsa û Arîda û
Vayzata kuştin; lê belê dest nea-
vêtin talanê.
11 Di wê rojê de hejmara yên ku
di qesra Şûşanê de hatine kuştin
anîn ber qiral. 12 Û qiral ji qi-
ralîçe Esterê re got: Cihûdiyan di
qesra Şûşanê de pênc sed kesî û
deh lawên Haman kuştin û tune
kirin; gelo di wilayetên dinî yê
qiral de çi kirine! Daxwaziya te
çî ye? Û dê ji te re bête dayîn û
xwesteka te çî ye? Û dê bête ki-
rin! 13 Û Ester got: Ger ji qiral re
qenc bête xuyanî kirin, ji Cihû-
diyên ku li Şûşanê ne, bila li gor
fermana îroj, destûra ku bila sibê
jî wusa bikin bête dayîn û deh
lawên Haman bi darê dardaki-
rinê daliqînin! 14 Û qiral, bona
ku wusa bête kirin emir da û li
Şûşanê ferman hate dayîn û deh
lawên Haman daliqandin. 15 Û
Cihûdiyên ku li Şûşanê ne, di
roja çardehan ya meha Adarê
de civiyan û li Şûşanê sê sed
kesî kuştin; lê belê dest neavêtin
talanê. 16 Û Cihûdên din yên ku
di wilayeta qiral de bûn civiyan
û bona canê xwe sekinîn û ji dij-
minên xwe ve aramiyê dîtin û
ji yên ku ji wan dikerihin heftê
û pênc hezar kes kuştin; lê belê
dest neavêtin talanê.

*Pîrozkirina Pûrîmê*

17 Ev kar di roja sêzdehê ya
Adarê de bû û di roja çardehê de
rehet bûn û wê kirin roja ziyafet û
kêfxweşiyê. 18 Lê Cihûdiyên ku
li Şûşanê ne jî di roja sêzdehê de
û di roja çardehê de civiyan û di
roja panzdehê de rehet kirin û wê

kirin roja ziyafet û xweşiyê. 19
Ji ber vê yekê ye ku, Cihûdiyên
gund, yên ku li bajarên bê dîwar
rûdinin, roja çardehê ya meha
Adarê dikin roja kêfxweşî û ziya-
fetê û roja qenc û dikin roja ku ji
hev û din re par şandinê.
20 Û Mordekay van tiştan nivî-
sand û ji hemû Cihûdiyên ku li
hemû wilayetên Ahaşveroş de,
yên ku li nêzîk û dûr in re, 21
bona ku her sal rojên çardeh û
panzdehê meha Adarê, 22 wekî
rojên ku Cihûdiyan ji neyarên
xwe ve aramiyê dîtine, bona xwe
wekî mehekî ku ji keserê derbasî
kêfxweşiyê bibin û ji şînê dizî-
virin roja qenc, bigirin û bona
emrê ku bila wan wekî rojên
ziyafet û kêfxweşiyê û ji hev û
din re par şandin û ji xizanan re
xelat şandinê bikin, bide wan,
nameyan şandin. 23 Û Cihûdan,
wekî ku dest pê kirine û wekî ku
Mordekay ji wan re nivîsandiye,
ji xwe re kirin kevneşop; 24 ji
ber ku neyarê hemû Cihûdiyan
Hamanê Agagî yê lawê Hamma-
datan, bona ku wan tune bike,
li dijî Cihûdiyan duzenê danîbû
û bona ku wan bieciqîne û tune
bike pûr, yanê pişk avêtibû; 25
lê belê dema kar hate ber qiral,
bona duzena xerab ya ku wî li
dijî Cihûdiyan danîbû û bona wî
û lawên wî bi darê dardakirinê ve
daliqînin bi nameyan emir da.
26 Ji ber vê yekê, ji van rojan li
ser navê Pûrê, Pûrîm gotin. Bo vê
yekê ji hemû gotinên vê nameyê
û ji tiştên ku di derheqê vî karî de
dîtine û ji ber her tiştên ku hatine
serê wan, 27 her sal van her du
rojan, li gor ku hatiye nivîsandin
û li gor dema ku hatiye eşkere ki-
rin derbas nekin û bigirin 28 û di
her nifşeyê de, di her malbatê de,
li her wilayetî û li her bajarî, bona
ku ev roj di bîr de bên û bên gir-
tin û di nava Cihûdiyan de bona
ku van rojên Pûrîm neyên derbas
kirin û bona ku di nava nifşeyan
de, dawiya bîranîna wan neyên,
Cihûdiyan biryarê dan û girtin ser
xwe û ser nîjadên xwe û ser yên
ku bi wan re yekbûyî ne.
29 Û qiralîçe Estera qîza Abîhaîl
û Mordekayê Cihûdî bona tesdîq
kirina ev nameya Pûrîmê ya du-
wemîn bi rayedariyek bê kêmasî
nivîsandin. 30 Û li gor ku Mor-
dekayê Cihûdî û qiralîçe Ester
emir daye wan, di karê rojiyan û
feryadên wan de, wekî ku bona
xwe û nîjadên xwe biryarê dane,
wan rojên Pûrîmê ên ku di demên
eşkere de ne bona tesdîq bikin,
31 ji hemû Cihûdiyan re ji sed
û bîst û heft wilayetên welatê
Ahaşveroş re bi gotinê aşitîvanî
û rasteqîniyê nameyan şandin.
32 Û emrê Ester van karên Pûrîmê
tesdîq kirin û li pirtûkê hate nivî-
sandin.

*Pesnahî û Bilindahiya Mordekay*

10 Û qiral Ahaşveroş xeracê
danî ser reşiyê û giraveyên
behrê. 2 Û hemû karên qudret û
hêza wî û nivîsa bitûmî ya di der-
heqê bilindahiya Mordekay, ya
ku qiral daye wî de, ma vana di
pirtûka dîrokan ya qiralên Medê
û Farsê de ne nivîsandî ne? 3 Ji
ber ku Mordekayê Cihûdî li paşî
qiral Ahaşveroş zilamê duwemîn
û di nava Cihûdiyan de zilamê
mezin û ji aliyê birayên xwe yî li
pirraniyê ne, meqbûl û zilamê ku
li qenciya neteweya xwe digere û
yê ji hemû nîjada xwe re gotina
aşitîxwaziyê dibêje bû.

# EYÛB

*Pêşgotin*

Kitêba Eyûb, behsa janên zilamekî rast yê ku rastî bêtariyên mezin hatiye dike. Eyûb hemû zarokên xwe û mal û milkê xwe ji dest ve winda dike, dikeve nexweşiyek tirsehêz. Pirtûk, berteka ku Eyûb û sê hevalên wî ya li dijî van bêtariyan danîne, bi sê axaftinên beramberî hev daxuyanî dike. Xwedayê ku nêzîkbûna wî ya mirovan dibe sedema gengaşiyê, ya dawîn ew bi xwe ji Eyûb re xuya dibe.

Hevalên wî, janên ku Eyûb dikişîne, bi têgihên kevneşopî yên olî daxuyanî dikin. Her tim, dihesibînin ku Xwedê qenciyê bi xelat dike û ceza xerabiyê dide û difikirin ku Eyûb ji ber ku xerabiyê kiriye van êşan dikişîne. Lê belê ev raman, bona daxuyanîkirina rewşa Eyûb gelekî kêm e. Eyûb vê cezaya giran li xwe heq nekiriye. Ji ber serrastî û qenciya wî, li dijî ya ku hatiye dîtin e. Tu carî fêhm nake ku çima Xwedê destûrê daye ku van bêtariyan were serê zilamekî mîna wî. Bi wêrî Xwedê bangî qadê dike. Baweriya xwe winda nake, lê belê dixwaze li ber Xwedê dîsa mîna mirovekî qenc xîreta xwe bistîne.

Xwedê bersiva pirsên Eyûb nade, lê belê bi hêza Xwedanî û helbestiya zaniyariyê bersiva baweriya wî dide. Wê çaxê Eyûb, bilindahî û zaniyariya Xwedê qebûl dike, ji ber gotinên bi hêrs û tund tobe dike.

Pirtûk, ya dawîn Eyûb çawa digihêje aramiya xwe yî kevin û di ser de jê zêdetir dewlemendtira wî digehîne. Xwedê bi hevalên wî yên ku sedema êşkişandina wî fêhm nekirine diazirîne. Tenê Eyûb bi seretayiya Xwedê ve hesiyaye.

*Xetên Bingehîn:*


| | |
|---|---|
| 1:1-2:13 | Pêşgotar |
| 3:1-31:40 | Eyûb û sê hevalên xwe |
| a. 3:1-26 | Gazincên Eyûb |
| b. 4:1-14:22 | Beramberî axaftina yekem |
| c. 15:1-21:34 | Beramberî axaftina duwem |

| | |
|---|---|
| ç. 22:1-27:23 | Beramberî axaftina sêwem |
| d. 28: 1-28 | Pesnahî ji zaniyariyê re |
| e. 29:1-31:40 | Gotinên Eyûb yên dawîn |
| 32:1-37:24 | Axaftina Elîhû |
| 38:1-42:6 | Bersiva Xwedê ji Eyûb re |
| 42:7-17 | Gotina dawîn |

*Eyûb, zilamek rast û kamil bû*

1 Di welatê Ûtsê de zilamek
hebû, navê wî Eyûb bû; ev
zilam rast û kamil bû. Ji Xwe-
dê ditirsiya û ji xerabiyan xwe
vedikşand. 2 Heft law û sê keçik
ji wî re bûn. 3 Bi hebûnê jî, heft
hezar mîhên wî, sê hezar deve-
yên wî, pênc sed cot gayê wî û
pênc sed kerên wî yên mê û gel-
lek dîlên wî hebûn. Û ji hemûya
lawên Rojhilatê, ev zilam, yê herî
mezin bû.
4 Û lawên wî diçûn û her yek,
di rojên xwe de, di mala xwe de
ziyafetê didan û bona ku bi wan
re bixwin û vexwin, dişandin û
bangî her sê xwuşkên xwe diki-
rin. 5 Û ûsa dibû ku, dema rojên
ziyafetê diqediyan, Eyûb dişand û
wan pîroz dikir. Û sibehê zû ra-
dibû û li gor hemûyan pêşkêşiyên
şewitandinê dida. Ji ber ku Eyûb
digot: Dibe ku lawên min sûcan
kiribin û di dilên xwe de, naletê li
Xwedê xwendibin. Eyûb her tim
ûsa dikir.

*Îmtîhana[1] Eyûb ya yekem*
Lûq 22,31-32

6 Û dema lawên Xwedê hatin ku
xwe li ber XUDAN pêşkêş bikin,
ûsa bû ku, Îblîs jî di nava wan de
hat. 7 Û XUDAN ji Îblîs re got:
Tu ji ku tê? Îblîs bersivê da XU-
DAN û got: Li dinê gerandinê û
li ser wir gerînê! 8 Û XUDAN ji
Îblîs re got: Te bala xwe baş da
qûlê min Eyûb? Ji ber ku li dinê,
yekî wekî wî nîne; zilamê rast û
kamil; ji Xwedê ditirse û ji xera-
biyê ve vedikêşe. 9 Û Îblîs bersi-
vê da XUDAN û got: Ma Eyûb li
cîhê vala ji Xwedê ditirse? 10 Ma
te li dora wî, li dora mala wî û li
dora her tiştên wî yên hene, çeperê
nezivirand? Te bereketê da karê
destên wî û malên wî, li welat zêde
bûn. 11 Lê belê niha destê xwe
dirêj bike û li heçî tiştên wî yî hene
bixe. Dê li ber wecê te naletê li te
bike! 12 Û XUDAN ji Îblîs re got:

1 Azmûn.

A vay, heçî tiştên wî yên hene, di
destê te de ne; lê belê destê xwe
dirêjî wî neke! Û Îblîs ji ber XU-
DAN derket.
13 Û ji rojan rojekê, dema lawên
wî û keçên wî, di mala birayê xwe
yî mezin de xwarinê dixwarin
û xemrê vedixwarin, ûsa bû ku,
14 şandiyek hat û ji Eyûb re got:
Ga cotê dajotin û ker jî li cem wan
diçêriyan; 15 Şebayiyan êrîşî ser
wan kirin û wan girtin û birin.
Xulaman ji şûran ve derbas kirin
û tenê ez, bona ku vana bigihînim
te, bi tena serê xwe reviyam û xe-
las bûm! 16 Hîn vî zilama digot,
yekî din jî hat û got: Ji ezmanan
agirê Xwedê ket û mîh û xulaman
şewitand û wan xwar û qedand. Û
tenê ez, bona ku vana bigihînim
te, bi tena serê xwe reviyam û xe-
las bûm! 17 Hîn vî zilama digot,
yekî din jî hat û got: Kildaniyan
bi sê liqan êrîşî ser deveyan ki-
rin û wan girtin û birin, tenê ez,
bona ku vana bigihînim te, bi tena
serê xwe reviyam û xelas bûm!
18 Hîn vî zilama digot, yekî din jî
hat û got: Law û keçên te, di mala
birayê xwe yî mezin de xwarinê
dixwar û xemrê vedixwarin 19 û a
vay, ji çolê wê de bahozek mezin
hat û li çar aliyê malê ket û ev li
ser xortan ve xera bû, ew jî mirin,
tenê ez, bona ku vana bigihînim
te, bi tena serê xwe reviyam û xe-
las bûm!
20 Û Eyûb rabû û qeftanê xwe çi-
rand û porê xwe jê kir û ket erdê
û secde kir 21 û got: Ez ji malza-
roka diya xwe, bi tazîtî derketim
û ez ê bi tazîtî vegerim wir; XU-
DAN da û XUDAN stend. Bila
navê XUDAN pîroz be! 22 Di
hemûya vî karî de Eyûb sûcê ne-
kir û bêrêtiyekê li Xwedê nekir.

*Îmtîhana Eyûb ya duwem*

2 Roja ku lawên Xwedê, bona
ku xwe li ber XUDAN pêşkêş
bikin, ûsa bû ku, Îblîs jî di nava
wan de, bona ku li ber XUDAN
xwe pêşkêş bike hat. 2 Û XU-
DAN ji Îblîs re got: Tu ji ku tê? Û
Îblîs bersivê da XUDAN û got: Li
dinê gerandinê û li ser wir gerînê!
3 Û XUDAN ji Îblîs re got: Gelo
te baş li qûlê min Eyûb nihêrt? Ji
ber ku li dinê yekî wek wî nîne;
zilamê kamil û rast; ji Xwedê
ditirse û ji xerabiyê ve vedikêşe
û li cîhê vala, bona ku ez wî da-
qurtînim te min kişkişand, lê belê
ew dîsa jî bi zexmî bi bêqisûriya
xwe ve girtiye! 4 Îblîs, bersivê
da XUDAN û got: Dêvla çer-
man çerm; belê, mirov bona canê
xwe, heger çiyî wî hebe, dide.
5 Lê belê, niha destê xwe dirêj
bike ku, tu bidî hestî û goştê wî.
Dê li ber wecê te, naletê li te bike!
6 Û XUDAN ji Îblîs re got: A
vay, ew di destê te de ye, lê belê
canê wî biparêze!

7 Û Îblîs ji ber XUDAN cuda
bû. Û ji pahniya lingan, heta serê
wî bi qunêrên xerab ve li Eyûb
xist. 8 Û Eyûb ji xwe re pariyek
kûzê[1] stend ku bila bi wê ve xwe
buxurîne[2]. Û di nava xweliyê
de rûniştîbû. 9 Û jina wî ji wî re
got: Ma tu hîn jî bi bêqisûrbûna
xwe ve bi zexmî digirî? Naletê li
Xwedê ve bîne û bimire! 10 Û wî
ji pîrekê re got: Ger pîrekên eh-
meq çawa bibêjin, tu jî ûsa dibêjî.
Çawa? Ma em qenciya Xwedê
qebûl bikin û xerabiyê qebûl ne-
kin? Di hemûya vî karî de, Eyûb
bi lêvên xwe ve sûc nekir.

*Sê Hevalên Eyûb*

11 Û gava her sê hevalên Eyûb;
Elîfazê Temanî, Bîldadê Şûahî û
Sofarê Naamayî, hemûya vê xera-
biya ku hatiye serê wî bihîstin, her
yek ji cîhê xwe ve rabûn û hatin.
Bona ku bi wî re biêşin û wî xem-
revîn bikin herin cem wî, di nav
hev de soz dan hev. 12 Û çavên
xwe ji dûr ve rakirin û wî nas ne-
kirin, dengê xwe bilind kirin û giri-
yan, her yek qeftanê xwe çirandin
û ber bi ezmanan, ji ser serê xwe ve
axê reşandin[3]. 13 Û ji ber ku dîtin
derdê wî çiqas mezin e, heft roj û
heft şevî bi wî re, li erdê ve rûniştin
û tu kes, gotinekê ji wî re negotin.

*Eyûb Diaxife*

Yêr 20,14-18

3 Paşî vêya, Eyûb devê xwe
vekir û naletê li roja bûyîna
xwe ve kir.
2 Û Eyûb dest bi gotinê kir û got:
3 Bila roja ku ez bûyîme tune
bibe!
Şeva ku got: Di rehmê de zilamek
peyde bû jî bila tune bibe!
4 Bila ew roj tarî bibe! Xwedê ji
jor ve li wê negere û bi ser wê ve
tîrêj şewle nede!
5 Bila tarîbûn û siya tariyê li wê
xwedî derkevin; ewr dakeve ser
wê; tarîbûna rojê, tirsehêzê bi ser
wê ve bixe!
6 Hela wê şevê, bila reşa tarî wê
bixumîne; di nava rojên salê de
wecê wê nekene; bila nekeve hej-
mara mehan!
7 A vay, bila ew şev stewr bibe;
dengê kêfxweşiyê nekeve wê!
8 Yên ku rojê binalet dikin, bila
naletê li wê bikin, ew zilamên ku
di hişyar kirina Levyatan de bi
huner in!
9 Bila sitêrkên êvarê tarî bibin;
bila li benda ronahiyê be, lê belê
nebîne û bila mijankên berbangê
nebîne!
10 Ji ber ku diya min, deriyên
rehma xwe negirt û tengasiyê ji
çavên min ve veneşart.

1 Sihûn.
2 An jî: Qunêrên xwe bikolîne.
3 Rijandin, an jî: Weşandin.

11 Ma çima gava bûm, ez nemi-
rim, gava ji rehmê derketim hilma
xwe yî dawîn nedam?
12 Çima çongan, bona ku
bimêjim pêsîran pêşwaziyê ji min
re kirin?
13 Ji ber niha ez ê veketî, rawestî
û raketî bibûma.
14 Ez ê bi qiral û şewirdaran ve,
yên ku wêranxanan bona xwe ava
kirine,
15 An jî bi serokên xwedî zêr, yên
ku malên xwe bi zîvan ve dagirti-
ne re rehet bikirama.
16 An jî mîna pitikên tîrêj nedîti-
ne, mîna cenînê ku veşartine tune
bibûma!
17 Li wir, yên xerab ji geremolê
ve dest dikşînin û yên westayî li
wir rehetiyê dibînin.
18 Li wir, yên girtî tim bê xem in;
dengê suxrevan nabihîzin.
19 Biçûk jî, mezin jî li wir in; kole
jî ji efendiyê xwe azad in!
20 Çima ronahiyê dide kesên bi
keser; çima jiyanê dide yên canê
wan biêş in?
21 Ew ku, bêriya mirinê dikin ku
nayên û ji xezîneyan zêdetir li wê
digerin.
22 Ew ku, gava gorê bibînin, heta
bicoşin kêfxweş dibin û şahiyê
dibînin.
23 Çima ronahiyê didin yê ku rêya
wî ji wî re hatiye nuxumandin û ji
zilamê ku Xwedê bi çîtan ve dora
wî zivirandiye?
24 Ji ber ku berî nan, nalîna min tê
û qêrînên min, mîna avê dirijin.
25 Ji ber, tiştê ku ez jê ditirsim
tê serê min û tiştê ku ez jê bêzar
bûmę, bi ser min ve tê.
26 Ez ne bêxem im, ne di aramiyê
de me û ne rehetim; lê belê ten-
gasî tê.

*Axaftina Elîfaz ya yekem*

4 Elîfazê Temanî bersivê da û got:
2 Ma gava mirovek bixwaze
gotinekê ji te re bêje, tuyê bixe-
yidî? Lê belê ma kî dikare ji go-
tinê ve xwe bigirî?
3 A vay, te dersê da gellekan û
destên ku sist bûne xurt kir.
4 Gotinên te, yên ku tilpekî dibûn
li ser pêlan ve girt û te çongên ku
diketin, zeximandin.
5 Lê belê niha, gava tê serê te, bi
zora te ve diçe gava li te dikevî, tu
şaş û metal dibî.
6 Ma ya ku tu pê bawer î, ne tirsa
te yî ji Xwedê ve yî û ya ku tu
hêvî dikî, ne bêqisûriya rêyên te
bi xwe yî?
7 Bêsûc kî helaq bû? Niha di bîra
xwe de bîne û li ku derê zilamên
rast tune bûn?
8 Li gor dîtina min, cotkarên fe-
sadiyê û yên ku tovê zehmetê
diweşînin, wê diçînin.
9 Bi hilma Xwedê ve tune dibin û
bi bayê hêrsa wî ve telef dibin[1].

[1] Diqedin, an jî: Dimirin.

10 Gurmîniya şêr û dengê şêrê har
bûyî hatin birrîn û diranê şêrên ci-
wan şikestin.
11 Şêrê pîr bûyî, ji bênêçîriyê ve
helaq dibe, çêlikên şêrê mê jî be-
lav dibin.
12 Bi dizîka gotinek ji min re hat û
guhê min kust û pistê ji wê ve girt.
13 Şevê, di nava ramanên ji xewn
û xeyalan de gava xewek giran di-
keve ser mirovan.
14 Erjengî û lerizîn hate ser min û
hemû hestiyên min lerizand.
15 Û ruhek ji ber min ve derbas
bû; mûyên bedena min hilperiyan.
16 Ew sekinî, lê belê min dîti-
na wî ne bijart; li ber çavên min
wecek hebû; gava her tişt bêdeng
mabû, dengekî bihîstim:
17 Ma qet dibe ku mirov ji ber Xwe-
dê ve bi dadî be? Qey dibe zilam ji
Afirkirê xwe ve hîn jî safîtir be?
18 A vay, ew bi qûlên xwe ve
ewle nabe, xeletiyê jî li milya-
ketên xwe ve bar dike.
19 Ji yên ku di xaniyên ji heriye[1]
ve rûniştine re çiqas zêde!
Ew ku, bingehên wan di axê de
yî, berî bizûzê tên eciqandin.
20 Di nava sibeh û êvarê de
wêran dibin; berî ku hayê kesekî
ji wan ve hebe, bi bêdawîbûnê
tune dibin.
21 Ma ne ûsa ye ku, gava tayê ça-
dirên wan ji hundirê wan ve bên
qetandin, hema dimirin? Lê belê
ne bi zaniyarê.

5 De bang bike, ma yekî bersivê
bide te heye? Û tuyê ji pîrozan,
berî bide kîjanî?
2 Ji ber ku hêrs yê bêhiş dikuje,
çavnebarî jî zilamê çavzîq dikuje.
3 Min yê bêhiş di reh dayînê de dît
û hema naletê li welatê wî ve kir.
4 Lawên wî li dûrî ewlekariyê ne
û di deriyan de dieciqin û yê ku
xelas bike jî nîne.
5 Zilamê birçî zadê wî dixwe,
heta ji nava keleman jî wî distî-
ne û ji malên wî re devê dafikan
vekiriye.
6 Ji ber ku derd ji zeviyê dernake-
ve û zehmet ji erdê ve naqede[2].
7 Lê belê mirov bi tengasiyê ve
tê dinê; mîna ku çirûsk ber bi jor
ve difirin.
8 Lê belê ez, ez li Xwedê digeriyam
û karê xwe ji Xwedê re berdidam.
9 Ew Xwedayê ku gellek tiştên
mezin û nayên kifş kirin, bê hej-
mar tiştên ku şaş dikin çê dike.
10 Baranê dide rûyê erdê û avê
dişîne ser zeviyan.
11 Bi vî awayî, yên ketî datîne
cîhekî bilind û yên şînê dikişînin,
derdikevin xweşiyê.
12 Ramanên fenekan xera dike
û destên wan nikarin fenekiyên
wan bikin.

1 Çamûr.

2 Çênabe, dernakeve.

13 Zaniyaran di fenekiyên wan
de digire û şîreta kesên hîlebazan[1]
hema xera dibe.
14 Di rojê de, li tariyê diqewimin
û nîvrojê, bi alîkariya dest ve di-
gerin, mîna ku şev be.
15 Lê belê ji şûr, ji devê wan, ji
destê mirovê xwurt yê xizan xe-
las dike.
16 Û hêvî tê ji xizan re, xerabî jî
devê xwe digire.
17 A vay, zilamê ku Xwedê wî
perwerde kiriye çiqas dilxweş e!
Û tu perwerde kirina Yê ku hêza
wî têra her tiştî dike, biçûk nebîne.
18 Ji ber ku ew diêşîne, ew dipêçî-
ne; ew birîndar dike, destên wî
qenc dikin.
19 Dê te ji nava şeş tengasiyan ve
xelas bike û di ya heftan de wê
bela destî te nede.
20 Te di xelayê de ji mirinê û di
cengê de, ji destê şûr ve xelas bike.
21 Tuyê ji qamçiya ziman ve
veşartî bimîne; gava têkçûn were,
tuyê jê netirse.
22 Tuyê bi têkçûn û xelayê ve bike-
ne û ji cenawirên erdê ve netirse.
23 Ji ber ku tuyê bi kevirên zeviyê
ve li hev bike; dê cenawirên be-
yarê bi te re aşitî kiribin.
24 Û tuyê bizanibe ku çadira te di
xweşiyê de yî û tuyê sehêtiyê li
welatê xwe ve bike, tu kêmasiyê
nebîne.
25 Û tuyê bizanibe ku dê nîjada te
zêde bibî, zîlên te jî mîna gîhayê
erdê.
26 Tam di kalepîriyê de, tuyê were
gorê, mîna komaleya demedan ku
di demsala xwe de tên rakirin.
27 A vay ev qas, me lêkolînê li wî
kirin, ûsa ye[2]; vêya guhdarî bike û
bona xwe bizanibe!

*Eyûb Bersivê dide*

6 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Xwezîka kesera min carekê
bê wezinandin û tevî bêtara min
bixin tereziyê!
3 Ji ber ku niha, dê ji qûmên beh-
ran ve zêde girantir biba; gotinên
min ji ber vêya çewtomewto bûn.
4 Ji ber ku tîrên Yê ku hêza wî
têra her tiştî dike di hundirê min
de ne, ruhê min, jahrên wan ve-
dixwe; toqînên Xwedê li hemberî
min, bona cengê rêz bûn.
5 Ma kerê hov li cem gîha dizi-
re? An jî, ma ga li cem êmê xwe
dibore?
6 Ma tiştê bêtahm, bê xwê tê xwa-
rin? An jî, ma di sipîka hêkê de
tahm dibe?
7 Canê min naxwaze ku ez dest
bidim wan; ew bona min mîna
nanê mekrûh in.
8 Xwezîka xwesteka min were û
Xwedê ya ku bêriya wê kirime
bide min!

[1] Çewtan.

[2] An jî: Rast e.

9 Ger Xwedê ji kerema xwe min
biecîqîne û destê xwe serbest berde
ku bila navika jiyana min jê bike!
10 Bila ev jî ji min re bibe xem-
revînî û ez di nava ezaba ku nayê
parastin de bi kêfxweşiyê ve
bicoşim, ji ber ku înkariya go-
tinên yê Pîroz nekirim.
11 Ma quweta min çî ye ku ez bi-
sekinim? Û dawiya min çî ye ku
ez sebir bikim?
12 Ma hêza min hêza kevirê ye?
An jî goştê min ji tûncê ye?
13 Ma ne ûsa ye ku, alîkariya min
bi min re nîne û şîreta zexm dûrî
min hate ajotin?
14 Ji kesên ku dilê wî duhule, ji
hevalê wî ve xêr hewce dike, ger
dev ji tirsa Yê ku hêza wî têra her
tiştî dike berde jî.
15 Birayên min xayîntiyê kirin,
mîna newalekê, mîna cîhava ne-
walên ku diherike û diçe.
16 Ew newalana ku, bi qeşa ve
şêlo ne û berf di nav wan de xwe
vedişêre.
17 Gava germ dibin, xuyanî na-
bin; gava germ dibe, ji cîhên xwe
tune dibin.
18 Ji rêya wan, karwan dikevin
çewtiyê; derdikevin çolê û helaq
dibin.
19 Karwanên Temayê nihêrtin,
rêwiyên Şeba hêviya xwe bi wan
ve girê dabûn.
20 Ji ber ku bawer bûbûn fedî ki-
rin; gîhaştin wir û şaş man.
21 Ji ber ku, hûn jî niha bûn tune-
yek; hûn toqînekê dibînin û ditirsin.
22 Ma gotime ku: Tiştekî bidin
min û: Bona min, ji malê xwe ve
bertîlê bidin?
23 An jî: Min ji destê neyar ve xe-
las bikin. An jî: Min ji destê rêbi-
ran ve azad bikin?
24 Hînî min bikin, ez ê jî bêdeng
bim: Û ez li ku şaş bûme, ji min
re bibêjin.
25 Gotinên rastiyê çiqas xwurt in!
Lê belê îkazên we, çi îspat dikin?
26 Ma hûn şermandina gotin-
an difikirin? Madem ku gotinên
bêçare mîna bayekî ne!
27 Belê, we bona sêwî pişkê dia-
vêtin û bona hevalê xwe bazariyê
dikirin.
28 Û niha ji kerema xwe ber bi
min werin! Bila ehd bibe ku, ez ji
we re derew nabêjim.
29 De vegerin, bila neheqî nebe;
belê, dîsa vegerin; doza min rast e!
30 Ma di zimanê min de neheqî
heye? Ma polkeyê min tiştên xe-
rab ji hev cihê nake?

7 Ma li rûyê erdê şer, ne bona
mirov e? Ma rojên wê jî ne
mîna rojên rojeger in?
2 Mîna kolê ku bêriya siyê dike,
mîna rojegerê li benda heqdestê
xwe ye.
3 Bi vî awayî, mehên hejartiyê bi
mêrastî dan min, bi parî jî şevên
tengasiyê.

4 Gava rakevim: Ez ê kengê ra-
bim? dibêjim.
Lê belê şev dirêj dibe û heta
berbangê ji vergera her du aliyê
xwe aciz dibim.
5 Goştê min bi kurman û qalikên
ji axê ne hatiye girtin; çermê min
diqermiçe û dîsa vedibe.
6 Çavê min ji makûka çilagê jîrtir
û bêyî hêviyê diçikin.
7 Di bîr bîne ku, jiyana min hil-
mek e! Dê çavê min careki din
qenciyê nebîne!
8 Çavên yê ku li min dinêre, dê
carekî din min nebîne; dê çavên
te li ser min bin, lê belê ez ê tune
bibim!
9 Ewr belav dibe û diçe, bi vî
awayî, yê ku dadikeve warê miri-
yan, carekî din dernakeve.
10 Êdî venagere mala xwe û êdî
cîhê wî, wî nas nake.
11 Ez jî bi zimanê xwe ve negirim;
bi tengasiya ruhê xwe bibêjim; bi
êşa canê xwe ve gilî bikim.
12 Ma ez behr im, an jî cenawirê
behrê me ku, te notirvanekî danî
ser min?
13 Gava ez: Dê livînên min,
xemrewîniyê ji min re bikin, dê
doşega min giliyê min aş bike!
dibêjim.
14 Tu min bi xewnan ve ditirsînî û
bi xewn û xeyalan ve bêzar dikî.
15 Û canê min xeniqandinê û ji
van hestiyan zêdetir mirinê qenc
dihesibîne.
16 Ez ji jiyana xwe ve dikerihim:
Heta hetayiyê jiyanê naxwazim;
destê xwe ji min ve bikişîne, ji ber
ku rojên min valahiyek in!
17 Ma mirov çî ye ku tu wî mezin
bikî û bila dilê te bi wî mijûl bibî,
18 Û, her sibeh tu li wî bipirsî û
her demê wî biceribînî?
19 Hîn tuyê çiqasî çavê xwe ji
ser min ve nezivirînî û qasî dema
ku ez şorika xwe daqurtînim min
bernedî?
20 Ger sûcekî kiribim, çi bi te ki-
rime, ya çavdêrê mirovan? Çima
te min ji xwe re kiriye nîşan?
Û ez ji xwe re bûm barek.
21 Û çima tu gunehê min
nabexşîne, fesadiya min jî naqe-
dîne?
Ji ber ku ez ê niha di axê de ra-
kevim û tuyê pirr li min bigerî; lê
belê ez ê neyêm dîtin!

*Axaftina Bîldad ya yekem*

8 Bîldadê Şûahî bersivê da û got:
2 Ma tuyê heta kengê vana bi-
bêjî? Û dê gotinên devê te mîna
bayekî xwurt bibin?
3 Ma Xwedê dadê xwar dike? An
jî, gelo Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike rastiyê xwar dike?
4 Ger lawên te li hemberê wî
sûcekî kiribin, wan jî daye destê
gunehên wan.
5 Ger tu bilezîne û li Xwedê ve
bigerî û li ber Yê ku hêza wî têra
her tiştî dike bigerî.

6 Ger tu rast û pak bibî; bi rastî dê
ew ê bona te niha hişyar bibe û dê
xweşiyê bide welatê te yî rastiyê.
7 Destpêka te biçûk jî be, dîsa dê
dawiya te zêde bimîne.
8 Lê belê niha, ji nifşa berê ve bi-
pirse ku, bapîrên wan lêkolîna çi
kirine, zehf bifikire.
9 Ji ber ku em zilamên doho ne û
tiştekî nizan in, ji ber ku rojên me
li rûyê erdê siyek in.
10 Ma qey ew ê hînî te nekin, ji te
re nebêjin û ji dilên xwe ve gotin-
an dernexin?
11 Ma li cîhê ku avzêl tune be, qa-
mir derdikeve, an jî li cîhê ku av
tune be, qamir mezin dibe?
12 Gava hîn hêşîn î, berî ku bê jê-
kirin, berî her gîhayî ziwa dibe.
13 Rêyên hemûyên ku Xwedê ji
bîr dikin ûsa ne û hêviya zilamê
bêbawer tune dibe.
14 Tiştên ku ew pê bawer e dişikê
û ya ku pê ewle ye, tora pîrê ye!
15 Xwe dide mala xwe[1], lê belê
ew nasekine; bi wî ve dizeliqe; lê
belê ew li cîhê xwe ve nasekine.
16 Li ber tava rojê, ew hêşîn e û
guliyên wî bi ser bexçê wî ve di-
kevin.
17 Rehên wan li komaleyek kevi-
ran dipêçe, mala kevira dibînin.
18 Ger ji cîhê xwe ve bê bişkuvandin
û xerabe kirin, ew cîh bi gotina: Te
nedîtime! wî înkar dike.
19 A vay, şahiya rêya wî ev e û yên
wekî din ji axê ve derdikevin.
20 A vay, Xwedê zilamê zaniyar ji
xwe ve navêje û bi destê kesên ku
xerabiyê kirine nagire.
21 Dê dîsa devê te bi ken ve
tijî bike, lêvên te jî bi qêrînên
kêfxweşiyê ve.
22 Dê şermezarî bi yên ku ji te ve
dikerihin bigire û çadira xeraban
tune bibe!

*Eyûb bersivê dide Bîldad*

9 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Rastî, dizanim ku ûsa ye; lê
belê ma mirov çawa dikare li ber
Xwedê mafdar derkeve?
3 Ger bixwaze ku keftûleftê bi wî
re bike, nikare ji hezaran yekî ber-
sivê bigihîne wî.
4 Yê ku ji dil ve zaniyar û di xwur-
tiyê de dijwar e, ew e; ma kî bi wî
re serhişkiyê kir û xweşiyê dît?
5 Yê ku çiyayan ji cîhên wan ra-
dike, ew e û hayê wan jê çênabe;
gava bi hêrsa xwe, wan bi serî û
binî dike.
6 Yê ku dinê ji cîhê wê dilerizîne
ew e û sitûnê wî dilerizin.
7 Yê ku emir dide rojê ew e, ew ji
dernakeve û sitêrkan mor dike.
8 Yê ku tena serê xwe ezmanan
dişidîne ew e û yê ku li ser pêlên
behrê ve dimeşe ew e.
9 Yê Termê merxê, sitêrka Oriyon
û birca Perwîn û odeyên başûrê
afirandiye ew e.

1 An jî: Tevnepîr xwe davêje mala xwe.

10 Yê ku tiştên mezin, yên ku
nayên kifş kirin û bêjimartin tiştên
ku şaş dike ew e.
11 A vay, ji cem min ve derbas
dibe jî ez wî nabînim û derbas
dibe û diçe jî ez hay jê nabim.
12 A vay, dadide nêçîrê, kî dikare
wî vegerîne? Kî ji wî re: Tu çi dikî
dibêje?
13 Xwedê hêrsa xwe venagerîne;
di bin wî de alîkarên Rehab dime-
lixin.
14 Ka li ku ma ku ez bersivê bi-
dim wî û bona bi wî re bikevim
keftûleftê, gotinên xwe hilbijêrim?
15 Ger ez bi heq bibûma jî, ber-
sivê nedidam wî; ez ê li ber Dad-
gerê xwe ve bigeriyama.
16 Ger bangî wî kiribûma û wî
jî bersivê bida min, dîsa ji ber ku
guh dayiye dengê min, ez ê bawer
nebûma.
17 Ew ku, bi bahozê ve min dieci-
qînî û li valahiyê birînên min zêde
dike.
18 Min bernade ku ez hilma xwe bi-
girim, lê bi tahliyê ve min têr dike.
19 Ger bona quwetê be, a vay,
xwurt e! Ger bona dadiyê be, ew
dibêje ku: Ma kî min bangî dad-
gehê dike?
20 Ger ez salih bim jî, devê min,
min xerab dike; ez zaniyar jî bim,
min xwar derdixe.
21 Ez bêqisûr im; dîsa jî canê xwe
nahesibînim; jiyana xwe biçûk
dibînim.
22 Gişt yek in! Bona vêya
dibêjim: Yê zaniyar jî, yê xerab jî
diqedîne.
23 Dema nişka ve bela dest bi
weşandina mirinê bike, bi mineta
bêsûcan ve kêfxweş dibe.
24 Dinê dane destê xeraban; yê
ku çavê serwerên wê girtiye ew e;
ger ne ew be, ma kî ye?
25 Lê rojên min jî ji nûçegîhan ve
leztir; bêyî dîtina qenciyê di revê
de ne.
26 Derbas dibin û diçin, mîna lot-
keyên sivik, mîna qertela ku bi ser
nêçîra xwe ve dadikeve.
27 Ger ez bibêjim ku: Giliyê xwe
ji bîr bikim; wecê xwe yî xerab e
berdim, bi firehî bibim.
28 Ez ji hemû derdên xwe bêzar
dibim, tuyê min bêsûc nehesibînî,
ez dizanim.
29 Ez ê mehkûm bibim; wê
gavê çima ez li valahiyê kedê
bikşînim?
30 Ger ez bi ava berfê ve xwe
bişom û destên xwe bi ava xweli-
yê ve paqij bikim.
31 Tuyê dîsa min rade kortala
pîsitiyan, dê kincên min jî ji min
erjeng bibin!
32 Ji ber, ew mîna min ne mirov e
ku ez bersivê bidim wî û em pev-
re biçin dadgehê.
33 Di nava me de kizîr nîne ku,
destê xwe deyne ser me her duyan.
34 Bila darê xwe ji ser min ve rake
û tirsehêza wî min bêzar neke.

35 Wê çaxê min ê bigota û ji wî
neditirsiyam; ji ber ku ûsa ez ne
bi xwe me[1].

10 Ji jiyana min ve, canê min
aciz bû.
Ez giliyê di hundirê xwe de ser-
best berdim; bi êşa canê xwe ve
bibêjim.
2 Ji Xwedê re bibêjim: Min meh-
kûm meke! Ma çima tu bi min re
ketiye keftûleftê ji min re bigehî-
ne?
3 Tu xedariyê dikî, keda destê xwe
biçûk dibînî û ronahiyê dide nêta
xeraban, ma ev bona te qenc e?
4 Ma di te de çavê mirovan
hene? An jî tu mîna mirov dibîne,
dibîn î?
5 Ma rojên te mîna rojên mirovan e,
salên te mîna salên mirovan e ku,
6 Tu li fesadiya min ve digerî û
lêkolîna sûcê min dikî?
7 Tu dizane ku, ez ne xerab im û yê
ku ji destê te ve xelas bike nîne.
8 Destên te ji her alî ve şikil dan
min, min afirandin; ma tuyê niha
vegerî û min tune bikî?
9 Di bîra xwe de bîne, ez lava di-
kim, te mîna heriyê şikil da min û
ma tuyê min dîsa vegerînî axê?
10 Ma te min mîna şîr nerijand û
min mîna penêr hişk nekir?
11 Te çerm û goşt li min kir, bi
hestî û rehan ve hevrêsand.
12 Te ji kerema xwe qencî û ji-
yanê da min û cihê kirina te ruhê
min parast.
13 Lê belê te vana di dilê xwe de
veşartin; ez dizanim ku, ya li cem
te ev e: 14 Ger ez sûc bikim, tuyê
çavdêriyê li min bikî û ji fesadiya
min ve tuyê min bêsûc dernexî.
15 Wey li serê min! Ger ez xerab
bibim û ger ez salih bibim, ez ê
bi têrbûna şermiyê û li nihêrtina
zebûniya xwe nikaribim serê xwe
bilind bikim.
16 Û ger serê min bilind bibe, tuyê
nêçîra min bikî, mîna şêrekî û dîsa
jî quweta xwe yî mirovan şaş dike,
di ser min de bide xuyanî kirin.
17 Tuyê li hemberî min, şahdeyên
xwe teze bikî û hêrsa xwe yî li ser
min zêde bikî; li hemberî min,
artêş li pêy artêşan!
18 Û te çima min ji rehmê ve der-
xist? Min ê hilma xwe yî dawîn
bidana û qet çavek jî nikariba min
bidîtina!
19 Ez ê bibama mîna ku qet ne-
bûme; ez ê dê ji rehmê bi gorê ve
bihatima birin!
20 Ma rojên min ne hindik in?
Êdî bibire û min berde ku ez hine-
kî firehiyê bibînim.
21 Berî ku herim, cîhê ku ez ji wir
ve venagerim; warê tarî û mirinê.
22 Warê tarîbûna mîna reş tari-
yêyî; warê tevlihevî û siya mirinê,
ew cîhê ku li wir ronahî mîna reş
tariyê yî!

---

1 An jî: Hişê min ne li serê min e.

*Axaftina Sofar ya yekem*

11 Û Sofarê Naamayî bersivê
da û got:
2 Ma qey bila civaka gotinan bê
bersiv bimînin?
Û ma yê ku gellekî gotinan dibêje,
bila salih bê hesibandin?
3 Ma bila pesnahiyê te mirovan
bêdeng bike?
Û tu, gava qerfên xwe bi mirovan
re bikî, divê tu kes te neşermîne?
4 Ji ber ku, tu dibêjî: Ya ku didim
hîn kirinê pak e! Û di çavên te de
ez paqij im.
5 Lê belê xwezîka Xwedê bibêje
û li hemberî te lêvên xwe veke!
6 Û razên zaniyariya xwe bigehî-
ne te! Ji ber ku, ew di fêhmkariyê
de qat qatiye.
Û bizanibe ku, Xwedê ji fesadiya
te li te diborîne.
7 Ma tu dikarî kûraniya Xwedê
bibînî? Tu karî bigihêje dawiya
Yê ku hêza wî têra her tiştî dike?
8 Qasî ezmanan bilind e, ma tu di-
karî çi bikî? Ji warê miriyan kûrtir
e, ma tu dikarî çi fêhm bikî?
9 Pîvana wê ji dinê ve dirêj û ji
behrê ve firehtir e.
10 Ger derbas bibe û biçe û ger
mifte[1] bike û ger bangî dadgehê
bike, kî dikare wî vegerîne?
11 Ji ber ku, ew bi zilamê derewîn
ve dizane; bala xwe nede jî, xera-
biyê dibîne.

[1] Kilît.

12 Lê belê, aqilê zilamê vala nîne
û mirov, mîna dahşika kerê hov
dizê.
13 Ger tu dilê xwe serrast bikî û ji
wî re destê xwe vekî.
14 Ger di destê te de xerabî hebe,
wê bi dûr bixe û bila neheqî di ça-
dirên te de rûnenê.
15 Bi rastî, tuyê wê gavê wecê
xwe yî bêleke bilind bikî û tuyê
zexm jî bibe û netirse.
16 Ji ber ku, tuyê tahba xwe ji bîr
bike, tuyê wê mîna avên herikiye û
derbas bûye di bîra xwe de bîne.
17 Û jiyana te, ji dema nîvrojê ve
zelaltir dibe; ger tarî bibe jî, dê
bibe mîna sibehê.
18 Û tuyê ewle bibî, ji ber ku hêvî
heye û tu li her aliyê xwe lêkolînê
dikî û di ewlekariyê de razê.
19 Û tuyê rakevî, yê bitirsîne jî
dê tune be û dê pirr kes wecê te
bixwazin.
20 Lê belê dê çavên xeraban bite-
fin û cîhê ku lê birevin jî dê tune
bibin û hêviya wan dê dayîna hil-
ma dawîn be.

*Eyûb bersivê dide Sofar*

12 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Qewma rasteqîn hûn in,
dê zaniyarî jî tevî we bimire!
3 Lê belê mîna we aqilê min jî
heye, ez ji we kêmtir nîn im û ma
tiştên mîna vêya, kî nizane?
4 Ez ji bo hevalê xwe bûm mîna
zilamek pêkenî.

Ez ku, bangî Xwedê dikirim û
bersivê dida min; zilamê rast û
bêqisûr bû kenokî[1]!
5 Di ramana kesê ku bêxem de
heqaret ji bêtarê re heye; bona
kesên lingên wan dişemite, ev
amade ye.
6 Çadirên tazîkiran di aramiyê de
û yên ku Xwedê anîne xezebê di
ewlekariyê de ne; Xwedê zêde bi
zêdeyî tîne ji destên wan re.
7 Lê belê niha ji heywanan ve bipir-
se û ew bila hînî te bikin û ji civîkên
ezmanan re, bila bigihînin te.
8 An jî ji axê re bibêje û bila hînî
te bike; masiyên behrê jî ji te re
dibêjin.
9 Di nava vana hemûyan de ma
kî nizane ku, destê XUDAN vêya
çêkiriye?
10 Ew XUDAN ku canê her
jîndarî, hilma hemû cûreyên
afiran di destê wî de ye.
11 Ger çawa polke tiştê ku dixwe
tahm bike, ma guh jî tiştê bihîsti-
ye, ûsa naceribîne?
12 Zanyarî di kalepîran de, fêhm-
karî jî di dirêjiya temenê de ye.
13 Zaniyarî û hêz di Xwedê de ye,
fêhmkarî û şîret yên wî ne.
14 A vay, ew xera dike û dîsa ava
nabe; mirov kilît dike, nikare vebe.
15 A vay, avan girê dide ku, ew
ziwa dibin û wan berdide ku din-
ya bi ser û binî dikin.
16 Hêz û zanyarî di wî de ne; yê
dixape û dixapîne jî yên wî ne.
17 Şîretkiran bi tazîbûyî dajo û
dadgeran dîn dike.
18 Girêka ku qiralan avêtine vedi-
ke û ta bi pişta wan ve girê dide.
19 Kahînan bi tazîbûyî dajo û zi-
lamên xwurt diqulipîne.
20 Gotinên zilamên ewle ji holê
radike û hişê kalepîran digire.
21 Heqaretan li ser emiran ve di-
rijîne û piştika[2] xwedî qudretan
sist dike.
22 Di hundirê tariyan de kûrani-
yan vedike û siya mirinê derdixe
ronahiyê.
23 Gelan mezin dike û wan tune
dike; gelan fireh dike û wan sir-
gûn dike.
24 Dinya hişê kesên ku li serê
qewmê xwe ne, radike û wan di
çolekî rêya wê nîne de digerîne.
25 Bi alîkariya destan ve di tariyê
de dimeşin û ronahî nîne û wan
mîna serxweşan digerîne.

13 A vay, çavê min hemûya
vana dît, guhê min bihîst û
wê fêhm kir.
2 Ez jî bi tiştên ku hûn dizanin za-
nim; ez ji we kêmtir nîn im.
3 Rastî, ez ji Yê ku hêza wî
têra her tiştî dike re bibêjim û
dixwazim ku bi Xwedê re têke-
vim dozê.

1 Qerfokî.
2 Şûtik.

4 Lê hûn jî, rêzkirên derewê ne;
hûn gişt bijîşkên[1] bêqîmet in!
5 Xwezîka hûn bi tûmî hiş bi-
bin! Ev ê jî bona we bibûya zan-
yarî.
6 Niha qala min bibihîzin û li
îdiayên lêvê min ve qenc guhdarî
bikin!
7 Ma hûn bona Xwedê, gotinek
neheq dibêjin? Û hûn bona wî bi
hîleyan dibêjin?
8 Ma hûn aliyê wî digirin? Û bona
Xwedê dibin dozdar?
9 Ger we bikole, dê qenc bibe? Ya
na, qey hûn ê wî jî mîna mirovan
dixapînin, bixapînin?
10 Hûn bi dizîka aliyê wî digirin,
helbet dê bi we ve bipeke.
11 Ma gelo mezinahiya wî we
bêzar nake û toqîna wî bi ser we
ve nakeve?
12 Tiştên ku hûn di bîra xwe
de tînin methelokên ji xweliyê
ne, kelehên we jî, kelehên ji he-
riyê ne.
13 Bêdeng bin, min berdin ku ez
bibêjim û dê çi bê serê min, bila
were!
14 Ma çima ez goştê xwe bigirim
nav diranên xwe û canê xwe tê-
xim nava lepên xwe?
15 A vay, dê ew min bikuje; hêvi-
ya min nîne; qet nebe ez li hem-
berî wî, rastiya rêyên xwe biparê-
zim.
16 Dê xelasiya min ev bibe ku,
dê mirovek bêbawerî dernekeve
hizûra wî.
17 Qenc li gotina min guhdarî
bikin û bila vegotina min di guhên
we de be!
18 A, vay, niha doza xwe rêz ki-
rim! dizanim ku, ez ê salih bêm
hesibandin.
19 Yê ku bi min re bikeve
keftûleftê kî ye? Ji ber ku ez ê wê
gavê bêdeng bimama û hilma xwe
yî dawîn bidama.
20 Lê van her du karî bi min ve
meke, wê gavê ez ê nikaribim ji
ber te xwe veşêrim.
21 Destê xwe ji ser min ve dûr bibe
û bila toqîna te min bêzar neke.
22 Wê gavê bangî min bike ku, ez
bersivê bidim te; an jî ez bibêjim,
ku tu jî bersivê bide min!
23 Fesadî û sûcên min çiqas in?
Guneh û sûcên min, bigehîne min!
24 Çima tu wecê xwe vedişêrî û
min ji xwe re neyar dihesibînî?
25 Ma tu dixwazî pelê ku ba dajo
bitirsînî? Û tuyê bera kayê hişk
bidî?
26 Ji ber ku tu li hemberê min,
tiştên tahl dinivîsîne û bi mêrasî,
fesadiyên ciwaniya min didî min.
27 Tu lingê min li darê ve dixî û
li benda hemûyên rêyên min di-
sekinî; sînorê li ber gavên min ve
dikişîne. Lê ez jî tiştekî kurmî û
telef bûyî me: mîna kincê bizûzk
lêxistiye me!

[1] Hekim, an jî: Doktor.

14 Mirov ku, ji pîrekê ve bûyî,
rojên wî kin in û têrî tenga-
siyê dibe.
2 Mîna çîçegê derdikeve û diçilmi-
se; mîna siyê direve û nasekine.
3 Ma tu çavên xwe li yê wusa re
vedike û min bi xwe re dikişîne
daraz kirinê?
4 Ma kî dikare yê gemarî ji paqij
ve derxîne? Qet kesek!
5 Madem ku rojên wî hatine bi-
jartin, hejmara mehên wî li cem te
ne û madem ku te sînorê wî dani-
ye û nikare wê de biçe.
6 Ji wî çavê xwe hilgire ku, bila
heta ku roja xwe biqedîne rehet
bike, mîna xebatkarê rojanî[1]!
7 Ji ber ku bona darekî hêvî heye,
jê bibe jî, dê dîsa bidome û zîlên
wê kêm nabin.
8 Ger reha wê di erdê de pîr bibe û
dalîta wê di axê de bimire jî;
9 Gava bêhna avê bigire, dê zîl
bide û mîna tîrhekê guliyan ber-
dide.
10 Lê belê mirov dimire û têk diçe
û zilam dê hilma xwe yî dawîn
bide, ka ew li ku derê ye?
11 Çawa ku, ji golan ve av dihe-
rikin û diçin û şet dibe çol û ziwa
dibe.
12 Mirov jî ûsa radikeve û rana-
be; ezman heta tune bibin, hişyar
nabin û ji xewa xwe nayên hişyar
kirin.
13 Xwezîka tu min di warê mi-
riyan de veşêre; heta ku hêrsa te
derbas bibe tu min veşêre,
demdiyarekê bi min de û wê gavê
min di bîra xwe de bîne!
14 Ma mirov bimire, diveje? Heta
ku nobedariya min biqediya, ez
di hemûya rojên şer de disekini-
yam!
15 Te bang dikir, min jî bersivê
dida te; te bêriya karê destên xwe
dikir.
16 Lê belê niha gavên min dij-
mêrî; ma tu li ser sûcê min nese-
kinî yî?
17 Gunehê min, di nav kîsikê de
mor kiriye û te mora xwe li ser fe-
sadiya min xist.
18 Lê belê çiya xera dibe û dibe
wêran û zinar ji cîhê xwe ve tê
kişandin.
19 Av keviran dimaşîne; lehiyên
wê, axa erdê diherikîne dibe; tu
wusa hêviya mirovan tune dikî.
20 Tu her tim wî mexlûb dikî û
ew derbas dibe û diçe; tu rûyê wî
diguherîne û dişîne.
21 Lawên wî rûmetê dibînin, lê
ew nizane û zebûn dibin, lê ew ji
halên wan fêhm nake.
22 Goştê wî tenê jana xwe dikişîne
û canê wî tenê bona xwe şînê di-
gire!

*Axaftina Elîfaz ya duwem*

15 Û Elîfazê Temanî bersivê
da û got:

1 Zehmetkêş.

2 Ma mirovê bi zanyarî, bi zanîna vala bersivê dide? Û zikê wî bi bayê rojhilatê ve dadigrî?
3 Ma mirov, bi gotinên kêr nayê pev re diaxifin? Û bi gotarên bêfêde?
4 Tu heta tirsa Xwedê jî ji holê radike û li ber Xwedê tu dibe astengê sehêtiyê.
5 Ji ber, yê ku hînî devê te dike, fesadiya te bi xwe yî û yê ku te wan bijartiye, zimanê fenekan e.
6 Yê ku te bi sûc derdixe, devê te ye, ne ez im û lêvên te, li dijî te şahdeyiyê dikin.
7 Ma zilamê pêşiyê bûyiye tu yî? An jî destpêka te, berî çiyayan e?
8 Ma te raza Xwedê guhdarî kiriye ku, tu zanyariyê bi taybetiya xwe dibînî?
9 Çi zanîna te heye ku, em bi wê nizanibin? Çî ye fêhm kirina te ku, bi me re nîne?
10 Di nav me de zilamê por sipî jî, kalepîr jî hene, ji bavê te jî pirr pîrtir in.
11 Ma ji te re hindik e xemrevîniya Xwedê, gotinên bi te re nerm?
12 Çima dilê te, te diherikînî? Û çavên te brûskan davêje ku.
13 Tu ruhê xwe, li dijî Xwedê dizivirînî û ji devê xwe ve gotinên ûsa derdixî?
14 Ma mirov çî ye ku paqij bibe? Û yê ku pîrek tîne dinê çi ye ku bila salih be?
15 A vay, Xwedê ji pîrozên xwe re ewle nîne, heta ezman jî di çavê wî de ne paqij in.
16 Li ku derê ma ku mirovê mekrûh û xerabe yî, ew mirova ku, neheqiyê mîna avê vedixwe!
17 Min guhdarî bike ku, ez nîşanî te bidim û tiştên ku dîtime bigehînim,
18 Tiştên ku zilamên zaniyar ji bapîrên xwe ve stendiye û agahdar dikin û tiştên veneşartine;
19 Ew bapîrên ku; welat hîn tenê ji wan re hatibû dayîn û ji nav wan ve hîn biyan derbas nebûbû.
20 Zilamê bêkêr, di hemû rojên xwe de digevize û salên ku bona zordestan hatine stendin jimartî ne.
21 Dengê toqînan di guhê wî de ne; gava ew di dilxweşiyê de be, rêbir bi ser wî ve tê.
22 Bawer nake ku dê ji tariyê ve vegere û şûr li benda wî ye.
23 Bona nan digere, bi gotina: Li ku derê ye? Dizane ku roja wî yî tarî li ber serê wî amade ye.
24 Tengasî û astengî wî bêzar dikin; wî mexlûb dikin, mîna qiralê ku bona cengê amade bûyî.
25 Madem ku, destê xwe li dijî Xwedê dirêj kir û li hemberî Yê ku hêza wî têra her tiştî dike re meydanê dixwaze.
26 Bi ser wî ve banz dide, bi patika tûnd, bi girêkên stûr ên mertalê xwe ve.

27 Madem ku wecê xwe qele-
wand û bez li ser pişta xwe da
hev.
28 Û di bajarên xerabûyî de,
di malên ku lê nayê rûniştin de
rûnişt, ew ku, li ber bûyîna komi-
kên kevira bûn.
29 Dê dewlemend nebe û hebûna
wî nesekine û malên wî, li rûyê
erdê dê belav nebin.
30 Dê ji tariyê ve neqete; agir gu-
liyên wî ziwa bike û dê bi hilma
devê Xwedê ve here.
31 Bila li cîhê vala nexape û ewle
nebe; ji ber ku dê mûçeyê wî va-
lahî bibe.
32 Dê berî roja wî, karê wî bê
temam kirin û guliyê wî hêşîn
nebe.
33 Mîna şivmêwê dê hersimê
xwe biweşînî û mîna darê zeytûnê
çîçega xwe bavêje.
34 Ji ber ku keriyê bêbawerî
stewr dibe û agir çadirên wanî
bertîlê dixwe û diqedîne.
35 Ji xerabiyê ve avis dimînin û
fesadiyê dizên û dilê wan feneki-
yê ava dike!

*Eyûb bersivê dide Elîfaz*

16 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Min pirr tiştên mîna vana
bihîstin; hûn gişt xemrevînên ra-
westinê didin in!
3 Ma dawî ji gotinên vala re dibe?
An jî çi zorê dide te ku tu bersivê
didî?
4 Ez jî dikarîbûm mîna we bigoti-
ma; ger li dêvla canê min canê we
hebûya. Karîbûm gotinan li ber
we rêz bikirama û li hemberî we
serê xwe kil bikirama.
5 Lê belê min ê bi devê xwe ve
hêzê bidama we û bi xemrevîniya
lêvên xwe ve we aş bikirama.
6 Ger ez bibêjim jî, xema min aş
nabe û ger bêdeng bibim, dê çi ji
ser min rabe?
7 Lê belê niha wî min rawestand;
te hemûya civaka min wêran kir.
8 Û te min şidand û qurmiçand,
vêya li dijî min şahde ye; lawazi-
ya min jî li dijî min radibe, li ber
wecê min şahdeyiyê dike.
9 Bi hêrsa xwe ve min çirand û
zehmetê'da min; diranên xwe li
ser min qîriçand; neyarê min ça-
vên xwe li ser min ve tûj dike.
10 Devê xwe bi ser min ve vekirin;
bi heqaretê ve li dêma min xistin;
li dijî min, li cem hev dicivin.
11 Xwedê min dide neheqan û da-
vêje destê xeraban.
12 Ez bê xem bûm û wî min peri-
tand û ji histuyê min ve girt, min
li erdê ve xist û perçe kir û min ji
xwe re bi nîşanî danî.
13 Tîrvanên wî, dora min digi-
rin; qet naparêze, gurçikê min
diqelişînî, zirava min bi erdê ve
dirijînî.
14 Di gewda min de gêdûk li ser
gêdûkan vedikî; mîna dêwekî
êrîşî ser min dikî.

15 Cilikekî[1] li ser çermê xwe ve
dirûtim û giramiya xwe, di axê de
gemarî kirim.
16 Ji giriyê wecê min sor bû û siya
mirinê li ser mijankên min in.
17 Dîsa jî di destên min de zor-
destî tune û duaya min pak e!
18 Ya ax, ser xwîna min nexumî-
ne û bila cîhê sekinê ji qêrîna min
re tune be!
19 Hîn ji niha ve, a vay, şahdeyê
min di ezmanan de ye û Yê ku
bona min şahdeyiyê dike li bilin-
dahiya ye!
20 Yên henekê xwe bi min re di-
kin jî hevalên min in; lê çavê min
bi hêsiran li Xwedê dinihêre,
21 Bona ku Xwedê di nava wî û
mirov de, di nava lawê mirov û
cîranê wî de li heqê bigerî.
22 Ji ber ku çend sal derbas bibî,
ez ê herim rêya ku ez jê venage-
rim.

17 Ruhê min şikest, rojên min
tefiyan, gor li benda min e.
2 Rastî, qerfkir li cem min in û
çavê min bi heqaretê wan ve şevê
diborîne.
3 Niha mişkane[2] bide, li hemberî
xwe bibe derhûdê min! Ma kî
heye ku bi min re dest pê bigire?
4 Ji ber ku, te dilê wan ji fêhmka-
riyê ve girt; ji ber vêya, tuyê wan
bilindtir nekî.
5 Zilamê bona ku parê bistîne he-
valên xwe dide dest, çavên lawên
wî jî ditefin.
6 Û min ji qewman re kir methe-
lok û ew tûyî wecê min dikin.
7 Û çavê min ji keserê ve tarî bû,
hemûyê endamên min jî mîna si-
yekî.
8 Dê zilamên rast bi vêya şaş bi-
bin û dê li dijî durûyan mîna zi-
lamê bê sûc tevgerê bike.
9 Û dê salih rêya xwe bigire, yê
destê wî paqij jî, dê hîn jî xwurt
bibe.
10 Lê hûn gişt, dîsa werin! Û ez ê
di nava we de zilamekî bi zanyarî
nebinîm.
11 Rojên min derbas bûn, tiştên
ku li wan nêt kirim, tiştên ku
malên dilê min in şikestin.
12 Şevê datînin dêvla rojê; dibêjin:
Ronahî nêzîkî tariyê ye!
13 Ger ez bi gotina: Warê miriyan
mala minî sekinîbim, ger livînên
xwe li tariyê raxistibim;
14 Ger ji kortalê re: Tu bavê min
î! Ji gur re: Dayik û xwuşka min
î! gotibim.
15 Wê gavê hêviya min li ku derê
ye? Û hêviya min, dê kî wê bi-
bînî?
16 Dê dakeve deriyê warê miri-
yan. gava em di axê de tevî hev
bigihêjin aramiyê!

[1] Yanê çûl.

[2] Rehin.

*Axaftina Bîldad ya duwem*

18 Û Bîldadê Şûahî bersivê da
û got:
2 Ma hûn ê heta çi wextî nêçîra
gotinan bikin? Fêhmkar bibin ku
em dawiyê biaxifin!
3 Ma çima me dixin cîhê heywa-
nan û di çavên we de bûn mindar?
4 Tu ku, bi hêrsa xwe tu xwe di-
peritînî, ma dê di oxra te de dinya
bê terikandin?
Û dê zinar ji cîh ve bê bar kirin?
5 Belê, dê ronahiya xeraban bitefe
û pêta agirê wî dê şewle nede[1].
6 Ronahî, dê di çadirê wî de bibe
tarî û qendîla wî, dê di ser wî de
bitefe.
7 Dê gavên hêza wî bitefe û şîreta
wî, dê wî bixîne.
8 Ji ber ku bi pêlên xwe ve,
xwe davêje torê û di ser torê de
dimeşe.
9 Dê pahniya wî têkeve feqê û da-
fik wî dabelihîne.
10 Bona wî di axê de girêkek
hatiye veşartin û di ser rê de feq
heye.
11 Dê ji her alî ve tirsehêz wî
bêzar bikin û li pêy pahniyên wî,
dê bera wî bidin.
12 Dê birçîbûn hêza wî bikoje û
bêtar her tim li cem wî amade be.
13 Dê endamên gewda wî bên
kojîn, dê lawê yekemîn yê mirinê
endamê wî bixwe û biqedîne.
14 Ji çadira ku pê ewle ye, dê bê
helkişandin û avêtin û dê ji qiralê
toqînê re bê birin.
15 Yê ku ne ji wî ye, dê di çadi-
ra wî de rûnê; dê kewkurd bi ser
welatê wî ve bê weşandin.
16 Dê rehên wî ji binî ve hişk bibin
û ji ser ve jî guliyên wî biçilmisin.
17 Dê bîranînên wî ji welat ve
winda bibe û ji kûçê jî navê wî dê
nemîne.
18 Dê ji ronahiyê, ber bi tariyê ve
bê ajotin û ji dinê ve bê qewiran-
din.
19 Dê di nava netewa wî de ne law,
ne jî zazê wî hebe û di warê wî yî
xerîbiya[2] wî de yê li pêy wî mayî
tune be.
20 Yên li paş de ne, dê li roja wî ve
şaş bimînin, mîna ku yên li pêşiyê
ketine toqînê.
21 Rastî, warê yên ku neheqiyê
dikin ûsa ye û cîhê yên ku Xwedê
nizanin ev e!

*Eyûb bersivê dide Bîldad*

19 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Ma hûn ê heta çi wextî
canê min bikesirînin û min bi go-
tinan ve bieciqînin?
3 Ev deh car e hûn bi min ve dipe-
kin; hûn bi min ve ji tundî kirinê
ve naşermin.
4 Ger ez ji rastiyê ve derketibim,
rêşaşiya min dê bi min re bimîne.

1 Nebiriqe.

2 Xurbet.

5 Ger bi rastiyê jî hûn li hemberê
min dikevin kubrê û şermezariya
min li ser çavên min ve bixin.
6 Niha bizanibin ku, di doza min
de Xwedê min xera kir û min bi
tora xwe ve pêçand.
7 A vay, ez bi gotina: Zordestî ye!
diqêrim û ji min re bersiv nîne û
ji bona alîkariyê diqêrim jî, ji min
re dadî nîne.
8 Çît kişand rêya min û nikarim
derbas bibim û tariyê danî ser
rêyên min.
9 Rûmeta min, ji ser min şêland û
taca serê min rakir.
10 Ji her alî ve min xera kir û ez
qediyam û hêviya min, mîna dare-
kî ji reha wê ve rakir.
11 Û li hemberî min hêrsa xwe
sor kir û min ji neyarên xwe ve
dihesibîne.
12 Çeteyên wî, gişt pev re tên û li
hemberî min rêyên xwe çêdikin û
li dora çadira min artêşgehê ava
dikin.
13 Birayên min ji min ve dûr xist û
nasên min, bi tûmî bûn xerîbên min.
14 Êdî ûsa bû ku, merivên min
nayên cem min, hevalên min yên
nêzîk jî min ji bîr kirin.
15 Mêvan û qîzên xizmetkarên
min, yên li mala min in, min bi
biyan dihesibînin;
ez di çavên wan de bûm xerîb.
16 Ez bangî kolê xwe dikim, lê
bersivê nade, ger ez bi zimanê
xwe li ber wî bigerim jî.
17 Hilma min ji pîreka min re
erjeng bû; lavaya min jî ji lawên
diya min re.
18 Zarokên biçûk jî, min biçûk
dibînin; ger ez rabim ser pêlan, li
dijî min diaxifin[1].
19 Hemrazên min tim ji min dike-
rihin, hezkirên min jî wecê xwe ji
min ve dan alî.
20 Hestiyê min bi çerm û goştê min
ve dizeliqe û ez bi çermê diranê
xwe ve hew reviyam û xelas bûm.
21 Ya hevalên min, bila gunehên
we bi min ve bê, bila gunehên we
bi min bê! Ji ber ku destê Xwedê
li min ve ket!
22 Çima hûn jî mîna Xwedê bera
min didin û bi goştê min ve têr
nabin?
23 Xwezîka niha gotinên min bi-
hatina nivîsandin! Xwezîka li pir-
tûkê ve bihatina qeyd kirin!
24 Bi pênûska hesin û gulê[2] ve
bona ku bibe daîmî ji zinarekî bi-
hata kolandin!
25 Lê belê ez dizanim ku, Xelas-
kerê min zîndî ye û ya dawiyê dê
ew li ser axê ve bisekine[3].
26 Û çermê min, ev bedena, paşî
ku tune bibe, wê gavê ez ê bêyî
goştê xwe Xwedê bibînim.

1 Dipeyivîn.
2 Sirbê.
3 Rabe, an ji: Çik bibe.

27 Ez ê wî di aliyê xwe de bibî-
nim û dê çavên min wî bibînin û
ne mîna xerîbekî. Di sînga min de
dilê min ji xwe ve diçe.
28 Madem ku reha kar di min de
yî; hûn: Em çawa bera wî bidin?
bibêjin.
29 Ji şûr ve bitirsin! Ji ber ku,
dadgehek heye; bona ku hûn biza-
nibin, ceza şûrê zehf bi hêrs dibe.

*Axaftina Sofar ya duwem*

20 Û Sofarê Naamayî bersivê
da û got:
2 Bona vêya ramanên min bersivê
didin min û ji ber vê sedemê, di
hundirê min de xiroş heye.
3 Pekandina ku min şermezar
dike bihîstim û di nava fêhmkari-
ya min de, ruh bersivê dide min.
4 Ma tu bi vêya nizanî, ji dema
kevnare de ji dema ku mirov hati-
ye xistinî dinê,
5 Qêrîna serfiraziya xeraban kurt
e û kêfxweşiya xeraban bi de-
mekê ye?
6 Ger bilindahiya wî bigihêje ez-
manan û serê wî bigihêje ezma-
nan jî;
7 Bi abadîn tune dibe, mîna pîsiti-
ya xwe; yên ku wî dîtibin; dê: Ew
li ku derê ye? bibêjin.
8 Dê mîna xewnan bifire û wî ne-
bînin; belê, dê mîna xewn û xe-
yalê şevê bê qewirandin.

1 An ji: Şir.

9 Çavê ku wî dîtiye, dê carekî din
wî nebînî; cîhê wî jî êdî wî nebînî.
10 Dê lawên wî rizaya xizanan
bixwazin û dê destê wî bi xwe
malê wî vegerînî.
11 Hestiyên wî bi ciwaniya wî ve
tijî ne, lê belê dê tevî wî di axê de
rakevin.
12 Di devê wî de xerabî şêrîn be jî,
di bin zimanê xwe de wê veşêre jî,
13 Wê biparêze, bernede jî û di
polkeya xwe de wê veşêre jî,
14 Di rêviyê wî de nanê wî tê gu-
hertin, di hundirê wî de dibe zira-
va marên kerr.
15 Hebûnan daqurtand û dê wan
verşe; dê Xwedê wan ji zikê wî ve
der bike.
16 Dê jahra marên kerr bimêje; dê
zimanê koremarê wî bukuje.
17 Dê ew ji coyên avê, ji çem û
newalên hungiv û ji dew[1] zewqê
negire.
18 Tiştê ku kedê daye wan, dê ve-
gerîne û dê nikaribe wê daqurtîne;
dê li gor malên ku bi dest xistiye
ve kêfxweş nebe.
19 Ji ber ku xizanan eciqand; dev-
devkî berda; bi zora xwe xaniyê
kişand, girt û ava nekir.
20 Madem ku di dilê xwe de bi
aramiyê nizanî; dê nikaribe tu
tiştê ku ji wê zewqê digire xelas
bike.
21 Tiştek ji ber xwarina wî mayî
nema bû; ji ber vêya, dê rewşa wî
ya qenc nedome.

22 Di nava tijîbûna firehiya xwe
de, ew ê bi xwe di tengasiyê de
be; dê destê heçî kesê ku di tenga-
siyê de ye, bigihêje wî.
23 Dema zikê xwe tijî bike, dê
Xwedê xeyda hêrsa xwe bavêje
ser wî û gava xwarinê bixwe, wê
bi ser wî ve bibarîne.
24 Dê ji çeka hesinî ve birevî, lê
belê dê kevana tûncî wî qul qulî
bike.
25 Tîrê dikişîne, ew jî ji bedena
wî ve derdikeve û serê wê yî di-
biriqe, ji zirava wî ve derdikeve,
toqîn li ser wî ne.
26 Bona xezîneyên wî, bi her ce-
lebî tarîbûn amade sekinîne; dê
agirê ku mirov nikarin pif bikin
wî bixwe û biqedîne; dê yê di ça-
dira wî de ji ber mayî telef bike.
27 Dê ezman fesadiya wî der-
xînin holê û erd li hemberî wî serî
hilde.
28 Dê zadên mala wî bê ajotin û
birin û di roja hêrsa wî de buhulin
û biherikin.
29 Para zilamê xerab, ji Xwedê ve
ev e û mêrasa ku bona wî ji Xwe-
dê ve hatiye emir dayîn ev e.

*Eyûb bersivê dide*

21 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Guhdarî bikin: gotina
min guhdarî bikin! Û bila bona
min xemrevîniyên we ev be.
3 Min berdin, ez jî bibêjim û paşî
ez bibêjim, hûn bi qerfî bisekinin.
4 Ma giliyên min ji mirovan re
ne? Û çima bila canê min teng
nebe?
5 Li min binêrin û şaş bimînin û
destê xwe deynin devê xwe!
6 Ez her ku di bîranîna vêya de
bêzar dibim û lerizînek bi goştê
min ve digire.
7 Ma yên xerab çima dijîn, kal di-
bin û qudreta wan zêde dibe?
8 Tevî wan, nîjada wan li ber wan
e, zîlên wan jî li ber çavên wan
dizexme.
9 Xaniyên wan di dilxweşiyê de
ne û bêtirs in, darê Xwedê jî li
wan naxe[1].
10 Gayê wan cot dibe û li valahi-
yê naçe; çêleka wan dizê û ji ber
ve navêje.
11 Çêlikên wan, mîna keriyekî
berdidin û zarokên wan pev re
dilîzin.
12 Ew bi defik û çenkê ve sit-
ranan dibêjin[2] û bi dengê bilûrê
ve kêfxweş dibin.
13 Rojên xwe di qenciyê de der-
bas dikin û di demekê kurt de da-
dikevin warê miriyan.
14 Û ji Xwedê re dibêjin: Ji me ve
here! Ji ber ku em ji zanîna rêyên
te hez nakin.
15 Ma Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike çî ye ku, em qûlitiyê ji wî re

[1] Ne li ser wan e, an jî: Li wan nakeve.

[2] An jî: Distrênin.

bikin? Û em dua ji wî re bikin,
qenciya me çî ye?
16 A vay, qenciya wan ne di des-
tên wan de ye, bila şîreta xeraban
ji min dûr be!
17 Çend cara qendîlka xeraban
tefiyaye, bêtarên wan bi ser ve
hatiye, Xwedê di xezeba xwe de
bi parî êşan dayiye wan.
18 Bûne mîna kayê di ber ba de
û pixmika[1] ku bahoz girtiye û bi-
riye.
19 Hûn: Xwedê fesadiya wî, dê
bona lawên wî veşêre! dibêjin.
Bona ku bi vêya bizanibe, bi ji wî
re bê dayîn.
20 Bila çavên wî helaqbûna wî
bibînin û ji xezeba Yê ku hêza wî
têra her tiştî dike, vexwe!
21 Ji ber ku dema hejmara mehên
wî bên birrîn, ma li pêy wî, bona
mala wî dê çi xema wî hebe?
22 Ma zaniyarî ji Xwedê ve tê hîn
kirin? Yê ku serweriyê ji kesên li
jorê ne re dike ew e.
23 Yek di gehîştina hêza xwe de
dimire, bi tûmî rehet[2] û bêxem.
24 Sitîlên wî bi şîr ve tijî ne û
mixa hestiyên wî teze ne.
25 Û yê din jî di nava êşa can de
dimire û qet qenciyê tahm neki-
riye.
26 Tevî hev di axê de radikevin û
kurm li ser wan tijî dibin[3].
27 A vay, ez bi ramanên we ve
dizanim, tevî wan desîseyên ku
we dixwestin zordestiyê bi min re
bikin.
28 Ji ber ku hûn dibêjin: Kanê
mala mîr? Û çadira ku xerab tê de
rûdinin, li ku derê ye?
29 Ma qey we ji kesên ku di rê
de derbas dibin re nepirsîn û aqil
negîhandin şahdeyiya wan ku,
30 Di roja bêtarê de zilamê xerab
tê parastin, di roja xezebê de rê ji
wan re tê nîşan dayîn?
31 Ma kî rêya wî li rûyê wî dixe?
Û berdêla kirinên wî kî dide wî?
32 Û wî dibin gorê û notirvaniyê
li gorê dikin.
33 Girêkên axa newalê ji wî re
şêrîn tên û her kes li pêy wî ve kaş
dibin. Û hejmara yên ku li ber wî
ne, nîn in.
34 Û çawa hûn xemrevîniyê li
cîhê vala bi min dikin? Yê di ber-
sivên we de dimîne jî tenê xayîntî
ye!

*Axaftina Elîfaz ya sêwem*

22 Û Elîfazê Temanî bersivê
da û got:
2 Ma mirov dikare ji Xwedê re bi
fêde be? Rastî, fêda zilamê baqil
ji xwe re ye.
3 Ma ger tu salih be, ji Yê ku hêza
wî têra her tiştî dike re zewq e?

1 Kapik, kapek.
2 Aram, riheti.
3 Dadgirin.

An jî ger tu rêyên xwe bêqisûr
bikî, qey bona wî qezencek e?
4 Bi te re pekandina wî, bi te re
ketina daraz kirina wî, ma ji bo
tirsa te yî ji wî ye?
5 Ma xerabiya te ne mezin e? Û
dawî ji fesadiya te re nîne.
6 Ji ber ku te ji birayê xwe ve bê-
sedem bi mişkanetî stend, te heta
kincên taziyan jî ji wan kir.
7 Te avê bi yê westayî neda ve-
xwarin û nanê xwe ji yê birçî
veşart.
8 Û gava hate zilamê xwurt, zevî
bû ya wî û li wir, zilamê birêz
rûnişt.
9 Te jinebiyan dest vala şand û
milên sêwiyan şikest.
10 Ji bo vê yekê li her aliyê te da-
fik hene û tirsa ku nişka ve dadi-
keve, te ditirsînî.
11 An jî tariye û tu nabîne û pirra-
niya avan te duxumîne.
12 Ma Xwedê ne li bilindahiya
ezmanan de ye? Û li bilindahiya
stêrkan binêre, ew çiqas bilind in!
13 Û tu dibêjî: Ma Xwedê çi di-
zanî? Ma dikare di nava reş tariyê
de hukmê bike?
14 Ewrên stûr ji wî re perdeyek
e û nabîne û li ser qûba ezmanan
ve digere.
15 Ma tuyê rêya kevn ya ku zi-
lamên xerab tê de meşiyane bi-
girî?
16 Ew zilaman ku, berî wextên
wan were hatin kişandin û sten-
din. Şêlav bi ser bingeha wan
ve girt.
17 Wan ji Xwedê re gotin: Ji me
here! Û: Ma Yê ku hêza wî têra
her tiştî dike, çi dikare ji bona me
bike?
18 Lê yê malên wan di qenciyê de
dadigre jî ew e; lê belê bila şîreta
xeraban ji min ve dûr be!
19 Salihan dîbînin û kêfxweş di-
bin û yê bêsûc bi wan re qerfê
dike:
20 Rastî, yên ku li dijî me serî hil-
dan hatin jêkirin û avêtin û agir
yên ku ji ber wan mayîne xwar û
qedand.
21 Niha bi wî re bibe heval û bi-
gihêje dilxweşiyê; qencî bi vêya
dê ji te re were.
22 Niha şerîetê ji devê wî ve bigi-
re û gotinên wî têxe dilê xwe.
23 Ger tu vegere Yê ku hêza wî
têra her tiştî dike, tuyê bê ava ki-
rin; ger tu neheqiyê ji çadirên xwe
ve dûr bixî.
24 Û zêr deyne axê, zêra Ofîrê jî
deyne nava bestikên newalê;
25 Û Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike, dê bibe zêrê te û dê ji te re
bibe zîvê biqîmet.
26 Ji ber ku tuyê wê çaxê di Yê
ku hêza wî têra her tiştî dike de
tahmê bibînî û wecê xwe ji Xwe-
dê re rakî.
27 Tuyê jê re dua bikî û ew ê te
guhdarî bike û tuyê qewlên xwe
bidî.

28 Tuyê di derheqê tiştekî de
qirarê bidî û ew ê li hembera te
bisekine û tîrêj dê li ser rêyên te
bibiriqe.
29 Gava mirov te nizm bikin,
tuyê: Bilindbûn heye! bibêjî. Û:
Ew zilamê dilnizm xelas dike.
30 Ew heta yê ku ne bêsûc e jî xe-
las dike. Belê, bi paqijiya destê te
ve xelas dibe.

*Eyûb bersivê dide Elîfaz*

23 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Îro jî giliyê min tahl e;
destê wî ji nalîna min ve girantir e.
3 Xwezîka bizanibama ku ka ez ê
wî li ku derê bibînim û bigihîştama
heta texta wî!
4 Min ê doza xwe li ber wî rêz
bikira û bi delîlan ve devê xwe
dagirtama.
5 Ez ê hînî tiştên ku dê bi bersivî
ji min re bibêje bibûma û ka dê çi
ji min re bibêje, fêhm bikirama.
6 Ma dê di hêza xwe yî mezin de
bi min re têketa keftûleftê? Na; lê
wî yê min guhdarî bikira.
7 Zilamê rast, dikarîbû li wir bi wî
re bibûya dozdar û ez ê ji Serwerê
xwe ve bi tûmî azad bibûma.
8 A vay, ez pêş ve diçim û li wir
nîne; paş ve diçim û wî seh nakim.
9 Di aliyê çep de, gava ew dike,
ez wî nabijêrim; di aliyê rast de
xwe vedişêre û ez wî nabînim.
10 Lê belê ew, bi rêya ku pê gir-
time dizane; gava min biceribînî,
ez ê mîna zêr derkevim.
11 Lingê min bi zexmî bi gavên
wî girtin; min bi rêya wî girt û jê
çewt nebûm.
12 Ez ji emrê ku lêvên te dane şaş
nebûm; ji mirazê xwe zêdetir go-
tinên devê wî veşartim.
13 Lê belê ew, tena serê xwe yî û
kî dikare wî bizîvirîne? Û canê wî
çi bixwaze, dê wê bike.
14 Ji ber ku her çi bikeve para
min, dê ew wê serfiraz bike û li
cem wî mînaka vana zêde ne.
15 Ji ber vêya, ez bona wî bêzar
dibim; her ku difikirim ji wî ditir-
sim.
16 Û Xwedê wêrekiya[1] dilê min
şikestand û Yê ku hêza wî têra her
tiştî dike, min bêzar kir.
17 Ji ber ku berî tariyê jê nebûm û
nehatim avêtin û li ber wecê min,
tariya reş ne nuxumand.

24 Çima Yê ku hêza wî têra
her tiştî dike, deman nebi-
jart û veneşart?
Û yên ku wî dinasin çima rojên
wî nabînin?
2 Sînoran ji cîhên wan radikin;
keriyan didizin û diçêrînin.
3 Kerê sêwiyan diajon; bi mişkanî,
gayê jinebiyê distînin.
4 Xizanan ji rê ve şaş dikin.
Hemûyên zebûnên welat xwe
vedişêrin.

1 Cesaret.

5 A vay, mîna kerên bejî yên li çolê
derdikevin karên xwe ji zû ve bi
gerîna xwarinê; bona zarokên wan
beyar nan dide wan. 6 Zewêdeyên
xwe ji zeviyê ve diçînin û di rezê zi-
lamê xerab de yên mayî didin hev.
7 Şevê tazî diborînin, bê kinc û di
tariyê de rûpiştên wan nîne.
8 Ji barana çiyayan ve şil dibin û
ji ber cîhê ku sitarbûnê nîne, xwe
li zinaran ve dipêçînin[1].
9 Bi sêwî digirin û wî ji pêsîrê ve
diqetînin û bi mişkaneyî ji zebûn
ve distînin.
10 Lê ew jî tazî digerin, bêkinc û
bi birçîtiyê demetan dikişînin.
11 Ji nava dîwarên van zilamana
zeytê derdixin; êrîşî mahsereyên
wan dikin û tîbûnê dikişînin.
12 Ji bajêr ve nalîna mirovan tê û
canê birîndaran di qêrînê de; lê belê
Xwedê li vê bêrêziyê ve nanihêre.
13 Vana yên ku li dijî ronahiyê
serî hildane ne; rêyên wî nas na-
kin û di rêyên wî de nasekinin.
14 Qesas tevî ronahiyê radibe;
yên zebûn û xizan dikuje û şevê
mîna diza ye.
15 Çavê kesê zinê dike jî li benda
tariya reş belek e:
Çav min nabîne! dibêje û rûpiştê
datîne wecê xwe.
16 Di tariyê de xaniyan qul dikin:
bi rojê xwe vedişêrin: ronahî çî ye
nizanin.

[1] Bi wan digirin.

17 Ji ber ku sibeh, bona wan
hemûyan siya mirinê ye; ji ber ku
elimîne toqînên siya mirinê.
18 Ji ser avan ve zû derbas dibin
û diçin; di rûyê erdê de para wan
binalet e; berî nadin rêya rezan.
19 Ziwayî û germî, avên berfê
digrè û dibe; warê miriyan jî yên
ku sûcan dikin.
20 Dê rehm wî ji bîr bike; kurm
wî bi şêraneyî bixwin; dê êdî di
bîr nê û neheqî mîna darekî dê
bişikê.
21 Pîreka stewr ya ku zarokê wê
nebûne dilîçikîne û qenciyê bi
jinebiyê re nake.
22 Ûsa ye, lê dîsa jî Xwedê bi
hêza xwe zilamên zordest cihê
dike; yê ku ji jiyana xwe ne ewle
ye, radibe ser pêlan.
23 Xwedê ewlekariyê dide wan û
bi wî ewle dibin û çavên wî, li ser
rêyên wan in.
24 Bilind dibin, piçekî din jî tune
dibin û nizm dibin, tim mîna yên
din ew jî tên girtin û birin
û mîna serê similê tên jêkirin.
25 Û ger niha ne ûsa be, ma kî
min derewîn derdixîne û gotina
min dadixîne tuneyiyê?

*Axaftina Bîldad ya sêwem*

25 Û Bîldadê Şûahî bersivê
da û got:
2 Serwerî û mezinahî li cem wî
ne: li cîhên xwe yî bilind de yê ku
dilxweşiyê ava kiriye ew e.

3 Ma hejmara artêşên wî hene? Û
ronahiya wî li ser kî ve nazê?
4 Wê gavê, ma mirov çawa dikare
li ber Xwedê salih bibe? Û yê ku
ji pîrekê ve bûyiye çawa dikare
paqij bibe?
5 A vay, biriqandina heyvê jî nîne
û sitêrk ji çavên wî re ne paqij in.
6 Ma ka li ku ma ku mirov; kur-
mikek! Û lawê mirov, kêzikek!

*Eyûb cara dawîn bersivê dide her sê hevalên xwe*

26 Û Eyûb bersivê da û got:
2 Te çawa alîkariyê bi yê
bêhîlet re kir! Te milê ku bêhêz e
çawa xelas kir!
3 Te çawa şîretan da yê ku zan-
yariya wî nîne. Û zanîna zexm bi
zêdeyî da hîn kirin!
4 Te gotinan ji kê re got? Û ruhê
ku ji te derketiye yê kî ye?
5 Di nava av û yên di hundir de
rûdinên de; mirî dilerizin.
6 Li ber Xwedê, warê miriyan tazî
ye; rûpiştê cîhê helaqiyê jî nîne.
7 Bakurê li ser valahiyê ve radixî
û li ser nînbûyê dinê dadiliqînî.
8 Avan bi ewrên xwe yî qalind ve
dipêçe û ewr di bin wan de naçire.
9 Ew wecê texta xwe duxumîne û
ewra xwe ser wê dişidîne.
10 Sînoran li ser avan xêz kir, heta
cîhê dawîn yê ku tarî û ronahî lê
diqedin.
11 Sitûnên ezman dilerizin û bi
pekandina wî ve şaş dibin.
12 Bi hêza xwe behrê li hev dixe
û bi fêhmkariya xwe Rehab qul
dike û derbas dibe.
13 Bi Ruhê wî ve ezman dixemilin;
destê wî marê ku reviyayî qul kir.
14 A vay, vana qeraxa rêyên wî ne
û ya ku me ji ber wî bihîstine çi
kustepistek biçûk e!
Lê belê, kî dikare gurmîniya
qudreta wî ya sereteya her tiştî ye,
fêhm bike?

27 Û Eyûb dîsa vegeriya met-
heloka xwe û got:
2 Bona heqê hebûna Xwedayê ku
heqê min ji destê min ve kişandiye
û stendiye û bona heqê hebûna Yê
ku hêza wî têra her tiştî dike, yê
ku tahliyê dide canê min,
3 Ji ber ku hîn di min de jiyana
min bitûm e û Ruhê Xwedê di
pozê min de ye.
4 Rastî, lêvên min neheqiyê
nabêjin û ji zimanê min ve derew
dernakeve!
5 Bila we rast hesibandin ji min
ve dûr be; heta ku ez hilma xwe yî
dawîn bidim, ez ê bêsûciya xwe ji
xwe ve neqetînim!
6 Ez bi zexmî bi rastiya xwe ve
digirim û wê bernadim. heta ku
temena min hebe, dê dilê min,
min şermezar neke!
7 Kesê xerab çawa be, bila ne-
yarê min jî ûsa bibe, zilamê neheq
çawa be, bila yê li dijî min radibe
jî ûsa bibe!

8 Ji ber ku gava Xwedê canê kesê
bêbawerî bistîne; ma hêviya wî çi
ye, ger hatibe qezenc kirin jî?
9 Ma gava tengasî were ser wî, dê
Xwedê hawara wî bibihîze?
10 Ma ji Yê ku hêza wî têra her
tiştî dike, zewqê dibînî? Û her tim
bangî Xwedê dike?
11 Ez, ya di destê Xwedê de yî,
hînî we bikim; ya di Yê ku hêza wî
têra her tiştî dike de veneşêrim.
12 A vay, we hemûyan dîtin; lê çima
hûn bi tûmî bûn zilamên vala?
13 Para ku zilamê xerab ji Xwedê
ve û mêrasa ku yên zordest ji Yê
ku hêza wî têra her tiştî dike ve
distînin, ev e:
14 Ger lawên wan zêde bibin, bona
şûr in û dê nîjada wî têrî nan nebe.
15 Yên ji ber wî mayî, dê di mi-
rinê de bên binerd kirin û dê jinên
wanî bî negirîn.
16 Ger mîna axê zîvan bide hev û
qasî heriyê kincan amade bike.
17 Ew amade dike, lê belê salih
li xwe dikin û zilamê bêsûc zîvan
par dike.
18 Mala xwe ava dike mîna bi-
zûzê û mîna çardaxa ku parêzvan
ava dike.
19 Bi dewlemend bûnê radikeve,
lê belê beşdarî bapîrên xwe nabe;
çavên xwe vedike û tune bûye!
20 Toqîn, mîna şêlavê digihêjin
wî; bahoz şevê wî didize û dibe.
21 Bayê rojhilatê radike û wî dibe
û diçe û wî ji cîhê wî ve dimale.
22 Xwedê[1] tîrên xwe davêje ser
wî û naparêze, ew dixwaze hema
ji destê wî bireve.
23 Çepikan ji wî re lê dixin û ji
cîhê wî ve ji wî re difikin.

*Li ser Zaniyariyê*

28 Ji ber ku bona zîv ûcaxek
madenê[2] heye û ji bo zêr jî
cîhek saf kirinê heye.
2 Hesin ji axê ve tê stendin û sifir
ji kevir ve tê hulandin.
3 Mirov dawî dide tariyê û
lêkolînê li kevirên siya mirinê
û tariya reş, heta sînora dawîn
dike.
4 Dûrî cîhê ku mêvan lê ne bîrê
vedide; li cîhê ku lingê mirov wir
ji bîr kiriye, li dûrî mirovan xwe
dadihelînin û kil dibin.
5 Ax, ji wê nan derdikeve û mîna
wê bi serî û binî dibe, mîna ku bi
agir ve bibe.
6 Cîhê yaqûda şîn, kevirên wî ne,
toza zêran jî bi wî re ne.
7 Civîka dirinde wê rêya nizane,
çavê baz jî wê nediye.
8 Cenawirên betran pêlên xwe
neavêtine wir; şêrê harbûyî jî ji
wir derbas nebûye.
9 Destê xwe dirêjî zinarê hişk
dike; çiyayan ji rehê wan ve bi ser
û binî dike.

1 Ew.

2 An ji: Kana madenê.

10 Ji nava latan coyan diqelişîne
û her tiştê bi qîmet, çavên wî
dibînin.
11 Bona ku danepalin şetan girê
dide û ya veşartî derdixe ronahiyê.
12 Lê belê zanyarî, ka ew li ku tê
dîtin? Û cîhê fêhmkariyê ku der e?
13 Mirov bi qîmeta wî nizane û li
warê jîndaran de nayê dîtin.
14 Balûpal dibêje: Ew ne di min
de ye û behr dibêje: Ne li cem
min e.
15 Ji wê re berdêl, zêrê saf, nayê
dayîn û bi bihaya wê zîv nayê we-
zinandin.
16 Kes nikare bi zêrê Ofîrê qîmeta
wê bihesibîne, bi heqîqa bi qîmet,
bi yaqûda şîn.
17 Wek wê bi qîmet nabe ne zêr
ne jî cam, bi qabên zêrê safî jî
nayê guhertin.
18 Bi navê mercan û belûrê ve
nayê bîranîn û buhaya zaniyariyê
ji inciyan ve sereta ye[1].
19 Yaqûda zer ya welatê Hebeşê
mîna wê nabe û bi zêra safî ve qî-
meta wê nayê birîn.
20 Wê gavê zanyarî ji ku derê tê?
Û cîhê fêhmkariyê ku der e?
21 Ji ber ku, ji çavê hemû jîndar-
an hatiye veşartin û ji civîkên ez-
manan ve hatiye veşartin.
22 Cîhê helaqê û mirinê dibêjin:
Me nûçeya wê bi guhê xwe ve
bihîstin!
23 Xwedê rêya wê fêhm dike û yê
ku cîhê wê dizane ew e.
24 Ji ber ku, li heta seriyên erdê
ve dinêre û yê di bin hemûya ez-
manan de yî dibîne.
25 Gava şehînê dixe bayê û bi
pîvanê avê dipîve.
26 Dema zagonê dixe baranê û rê
ji brûska gurmîniya ezman ve çê
dike.
27 Wê wî demê dît û têgîhand; wê
zeximand û him jî vekoland[2].
28 Û ji mirov re got: A vay, tirsa
XUDAN, zanyarî ev e û ji xerabi-
yê ve vekişîn fêhmkarî ye!

*Eyûb dîsa vedigere Metheloka xwe*

29 Û Eyûb dîsa vegeriya met-
heloka xwe û got:
2 Xwezîka ez mîna mehên kev-
nare bûma. Mîna rojên ku Xwedê
min diparast.
3 Wê gavê ku, qendîla wî li ser
serê min ve biriqî û di tariyê de ez
bi ronahiya wî ve dimeşiyam.
4 Ger ez mîna di rojên xwe yî
gehîştinê de bûma; hevaltiya
Xwedê ya ku wê demê, li ser ça-
dira min bû.
5 Hîn Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike bi min re bû, zarokên min jî
li dora min bûn.
6 Şopên min ên wê demê bi şîr ve
dihatin şuştin û li cem min zinar,
şêlavên rûn diherikand!

---

1 An jî: Ji duran ve bilindtir e.

2 Lêkolîn lê kir.

7 Gava ez ji derî ve derdiketim
bajêr, li qadê kursiya xwe amade
dikirim.
8 Ciwanan min didîtin û xwe
vedişartin û yên kalepîr radibûn
ser pêlan û disekinîn.
9 Serokan ji gotinan ve ditirsiyan
û destên xwe dixistin devên xwe.
10 Dengê mîran dihat birîn û zi-
manên wan bi polkeyên wan ve
dizeliqiyan.
11 Ji ber, heta ku guh dibihîst,
bona min digot dilxweş e û heta
ku çav didît, bona min şahdeyiyê
dikir.
12 Ji ber min zebûnê ku bangî alî-
kariyê dike û sêwiyê ku bêalîkar e
xelas dikir.
13 Min duaya kesê ku di xetera
mirinê de yî distend û dilê jinebi-
yê, ji kêfxweşiyê ve kilaman di-
dam gotin.
14 Rastiyê li xwe kirim, wê jî min
ji xwe re kir kinc; dibêje qey da-
diya min kofî û qeftan bû.
15 Ez ji kor re çav bûm û ji kulek
re jî ling.
16 Bona xizanan ez bav bûm û
doza mirovê ku wî nas nakim, ez
wî vedidam.
17 Û diranê kakîlê yê xeraban
dişikandim û nêçîrê ji diranên wî
ve diqetandim.
18 Û digotim: Ez ê hilma xwe
yî dawîn di hêlîna xwe de bidim
û rojên xwe mîna qûmê zêde
bikim.
19 Rehê min ber bi avê ve dirêj
bûne û xunav şevê di guliyê min
de diborîne.
20 Bilindahiya min di hundirê
min de teze ye û di destê min de
kevana min nû dibe.
21 Li benda min diman û dise-
kinîn û bi gotina ka hela şîreta wî
dê çi be, bê deng diman.
22 Paşî gotinên min, dubare nedi-
kirin û gotinên min, dilop bi di-
lop, li ser wan ve dirijiya.
23 Û mîna li benda baranê bin, li
benda min disekinîn û mîna bêri-
ya barana dawîn bikin, devê xwe
vedikirin.
24 Hîn ew ne bawer bûn, lê belê ez
bi wan re dikeniyam û nikarîbûn
zelaliya wecê min şêlo bikin.
25 Rêya wan dibijartim û di serî
de rûdiniştim û mîna qiralê di
nava leşkeran de yî rûniştibûm,
mîna zilamê ku xemrevîniyê li
kesên bi şîn ve dike.

30 Niha jî, yên ji temenê ji
min ve biçûktir in; bi ser
min ve dikenin.
Ew zilamên ku, min şerm dikir;
bavên wan bikim şirîkê kûçikên
keriyê xwe.
2 Hêza destên wan jî, ma ji çi karê
min re dibûn? Di wan de zîndetî
nîne.
3 Ji xizanî û birçîbûnê ve çilmisî-
ne: di tariya çol û tenhayiyan de
cîhê ziwa dikojin.

4 Li cem deviyan tolik jêdikin û xwarina wan koka deviya retemê ye.

5 Ji nava mirovan ve tên qewirandin; mîna ku li pêy dizan ve bê bang kirin, li pêy wan bang dikin.

6 Di newalên tirsehêz de rûdinin, di kovikên zinaran û qulikên erdê de.

7 Di nava deviyan de dizirin; li bin deviya reş de dirêj dibin.

8 Ew lawên ehmeqa ne û him jî lawên bênavan; bi qamçiyan ji welat ve hatine qewirandin!

9 Û niha ez bûm kilamên wan û metheloka wan jî me.

10 Ji min dikerihin, li dûr ve disekinin, ji tûkirina wecê min ve jî venakişin.

11 Ji ber te tayê xwe vekir û min zebûn kir û wan li ber min legab derxist[1].

12 Ji aliyên minî rastê, pêxwas radibin; lingê min tehn didin û li hemberî min, rêyên xwe yî helaq kirinê çê dikin.

13 Rêya min xera dikin; ew zilamên ku alîkarên wan nîne, alîkariyê bi bêtara min ve dikin.

14 Wekî ji gêdûkek fireh ve bikevin; di nava gurmîniya xerabûnê de li ser min ve digindirin.

15 Toqîn vegeriyan bi ser min ve xera bûn; mîna bayê şerefa min diqewirînin û bextiyariya min mîna ewrekî derbas bû û çû.

16 Û niha di hundirê min de canê min duhule. Rojên zebûniyê min bi dest ve xistin.

17 Şevan di hundirê min de hestî qul dibin û êşên ku min dikojin qet nasekinin.

18 Ji zêdeyiya dijwariya Xwedê, kincê min li ser min ve qermiçîn; mîna berstuyê qutikê min, min dipêçe.

19 Min avêt heriyê û ez bûm mîna toz û mîna xweliyê.

20 Ez bangî te dikim û tu bersivê nade min; ez radibim ser pêlan û tu çavê xwe ziq dide ser min.

21 Tu bona min bêînsaf bû; tu bi quweta destê xwe ezyetê bi min ve dikî.

22 Tu min li ser ba dikî û datînî û radikî û tu min di nava bahozê de duhulînî û diqedînî.

23 Ji ber ku ez dizanim; tuyê min bibe mirinê û mala ku hemûyên dijîn, dê li wir bicivin.

24 Lê belê ma gava mirov dikeve, destên xwe dirêj nake? Û di nava bêtarê de, ji ber wê bangî alîkariyê nake?

25 Ma ez bona kesê ku di tengasiyê de ye, nedigiriyam? Bona xizan, canê min bi keser nedibû?

26 Ez li benda qenciyê bûm, lê belê xerabî hat; min ronahiyê hêvî dikir, lê belê tarîbûn hat.

27 Dilê min dikele û aramiya wê nîne; rojên zebûniyê derketin ber min.

1 An jî: Ew li diji min bêlegab bûn.

28 Ez bi şînê ve digerim, roj nîne;
di nava civakê de radibim û bangî
alîkariyê dikim.
29 Ez bi çeqelan re bûme bira û bi
heştirmê ve heval.
30 Çermê min reş bû û ji ser min
ve dikeve, hestiyên min jî ji ger-
miyê ve dişewitin.
31 Û dengê çenka min vegeriya
qêrîna şînê; ya bilûra min jî vege-
riya dengê kesên digirîn.

31 Min bi çavên xwe re pey-
manekê çê kir û ez ê çawa
çav bavêjim qîzikê?
2 Û çî ye ji jor, ji Xwedê ve par
û ji bilindahiyan ji Yê ku hêza wî
têra her tiştî dike, mêras çî ye?
3 Ma bêtarek neheq, bona kesên
ku bi fesadiyê ve kar tînin jî ne
asîw e?
4 Ma ew rêya min nabînî? Û hemû
gavên min najmêrî?
5 Ger ez bi derewîtiyê meşiyabim
û ger lingê min ber bi hîlê ve lez
kiribe, 6 ez di şehîna rast de bême
wezinandin ku; bila Xwedê bitû-
niya min bizanibe.
7 Ger gavên min ji rê ve şaş bû-
bin; dilê min jî li pêy çavê min
ve meşiya be, ger gemar li kefên
destên min ve hatibe dayîn:
8 Ez biçînim û bila keseki din bi-
xwe û zîlên min, bila ji rehên xwe
ve bên hilkişandin!
9 Ger dilê min bi pîrekê ve xapiya
be û kemînê avêtibim ber deriyê
cîranê xwe;
10 Bila jina min, ji merivekî din
re aşê bizivirîne û bila kesên din
bi ser wê ve xwar bibin!
11 Ji ber ku dê ev biba xerabî û
sûcekî dadgehîn.
12 Ji ber ku, ev agirek e, heta
cîhê helaqê dixwar û diqedand
û hemû zadên min, ji kokê ve
hildikişand[1].
13 Ger dema bi min re ketibin
keftûleftê; doza dîl an jî cariya
xwe biçûk dîtibim;
14 Gava Xwedê rabe ser pêlan,
ma ez ê çi bikim? Û gava sehêti-
yê li min bike, ma ez ê çi bersivê
bidim wî?
15 Ma yê min di zikê dayikê de
afirandiye, wî jî ne xuluqandiye?
Û yê di rehmê de şikil daye me,
ne yek e?
16 Ger xizanan, ji xwestinên wan
ve dûr xistibim; an jî çavên jinebi-
yê tefandibim,
17 An jî pariyê xwe tenê xwari-
bim; ger yê sêwî jî ji wê nexwa-
ribe;
18 Bi ya rastî, ji ciwaniya min ve
li cem min mezin bû; mîna li cem
bav be.
Û ji roja bûyina xwe ve rêberiyê ji
jinebiyê re kirim.
19 Ger min, yê ku ji ber bê kinci-
yê dike bimire; an jî xizanê rûpiştê
wî nîne dîtibim;

[1] Radikir.

20 Û pişta wî dua xêrê ji min re
nekiribe û bi rîsê mîhên min ve
germ nebûbe;
21 Ger, ji ber ku dîtime, di deriyê
min de alîkarê min e; bo vê yekê
destê xwe li sêwî rakiribim;
22 Bila serpiyê min ji hestiyê
bêrîkê ve bikeve û milê min ji
hestiyê ve bişikê!
23 Ji ber asîwa ku ji Xwedê ye,
bona min toqîn e û ji ber rewnaqi-
ya wî tiştek ji destê min ve nayê.
24 Ger hêviya xwe bi zêran ve
girê dabim û ji zêra xalis re: Ya ku
ez pê ewle dibim tu yî! gotibim;
25 Ger ji ber hebûna min zêdeyî û
ji ber ku destê min qezenc kiriye
kêfxweş bûbim.
26 Ger dema şewle dida li rojê;
an jî dema di nava biriqandina wê
de dimeşiyam li heyvê ve nihêr-
tibim.
27 Û dilê min bi dizîka xapiya be û
devê min destê min ramûsandibe;
28 Dê ev jî bibûya sûcekî dad-
gehîn; ji ber, ûsa dihat ku mîna
Xwedayê li jorê ye înkar ki-
ribama.
29 Ger ez bi helaqa yê ku ji min
re dikeribe, kêfxweş bûbim; an
jî dema xerabî gîhaştibe wî ez ji
kêfê ve coşiya bim.
30 Belê, bi naletê ve, bi xwestina
canê wî, nehiştim ku zimanê min
sûcê bike.
31 Ger zilamên çadira min nego-
tibin: Ma kî heye bi goştê ku wî
daye xwarin têr nebûye?
32 Xerîb şevê li kuçê nediborand;
min deriyê xwe ji rêwiyan re jî
vedikir.
33 Ger bi veşartina ku; ez fesadiya
xwe di paşla xwe de veşartibim û
mîna mirovekî gunehên xwe nu-
xumandibim,
34 Ji ber ku ji zêdeyiya gel ve tir-
siyame, ji ber ku heqaretên eşîran
min bêzar kirine
û ger ez bêdeng mabim û ji derî
ve derneketibim.
35 Xwezîka yekî li min guhdarî
dike hebûya! A vay, destxeta min,
bila Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike, bersivê bide min. Û balo-
ra ku neyarê min nivîsandiye di
destê min de bûya!
36 Rastî, min ê wê di serpiyê xwe
de bigeranda; bona ku ji min re bibe
tac, min ê li serê xwe bipêçanda.
37 Min ê hejmarên gavê xwe
bigîhenda wê û mîna serwerekî
nêzîkî wê bibûma.
38 Ger axa min, li dijî min bi
qêrîn û hawarê bike û qelşên hev-
carê pev re di giriyê de bin.
39 Ger zadê wan bê pere xwari-
bim; an jî canê xwediyê wan te-
fandibim;
40 Bila li dêvla genim kelem û li
dêvla ceh jî gîhayê xerab hêşîn
bibe[1]!
Gotinên Eyûb qediyan.

1 An jî: Gîhayê xerab derkeve.

*Elîhû dest bi axaftinê dike*

32 Û ev her sê meriv, êdî dev
ji bersiv dana Eyûb ber-
dan, ji ber ku, ew di çavê xwe
de salih bû. 2 Wê demê hêrsa
Elîhûyê ku lawê Barakelê Bûzi-
yê ku ji eşîra Ramê ye, sor bû;
hêrsa wî li dijî Eyûb sor bû, ji
ber ku wî xwe ji Xwedê zêdetir
biheq derdixist. 3 Li dijî her sê
hevalên wî jî hêrsa wî sor bû, ji
ber bersivê nedîn ku Eyûp sûcdar
derxistin. 4 Û ji ber ku ew, bi te-
menê ve ji wî mezintir bûn, bona
ku gotinên xwe ji Eyûb re bibêje,
Elîhû li berê bû[1]. 5 Û gava Elîhû
dît ku di devê van her sê kesan
de jî bersiv nîne; hêrsa wî sor bû.
6 Û Elîhûyê lawê Barakelê Bûzî
bersivê da û got:
Bi temenî ez biçûk im; hûn jî zehf
kalepîr in; ji ber vêya min xwe da
alî û ji nîşandana zanîna xwe ku
ez rê we bidim tirsiyam.
7 Gotim ku: Bila roj bibêjin û zê-
deyiya rojan zanyariyê hîn bike.
8 Lê belê di mirov de ruh heye û
hilma Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike, fêhmkariyê dide wan.
9 Yên bi zanyar in, ne yên mezin
in, yên rastiyê fêhm dikin jî, ne
kalepîr in.
10 Bo vêya gotim: Min guhdarî
bike; ez jî zanîna xwe nîşan bi-
dim!

[1] Li bendê bû, sekinî bû.

11 A vay, li benda gotinên
we mam; gava we lêkolînê li
gotinê dikirin, min guh da delîlên
we.
12 Min qenc bala xwe da we û a
vay, di nava we de kesekî Eyûb
bêdeng bihêlî û bersivê bide wî
tunè bû!
13 Qet nebêjin: Me zaniyarê dîtin;
Xwedê li hemberî wî serdest tê,
ne mirov!
14 Û gotinên xwe, li hemberî min
rêz nekir; ez ê jî bi gotina we ve
bersivê nedim wî.
15 Şaş bûn, êdî ew bersivê nadin;
gotin ji wan ve hate stendin!
16 Ma qey ji ber ku ew nabêjin,
ez bêdeng bimînim, ji ber ku di-
sekinin, êdî bersivê nadin?
17 Ez jî bersiva ku dikeve para
min bidim; ez jî tiştê ku dizanim,
nîşan bidim.
18 Ji ber ku hundirê min tijî go-
tin; ruhê di hundirê min de min
dişidîne.
19 A vay, hundirê min mîna xem-
rekî venebûyî; li ber derizînê ye,
mîna meşkên nû.
20 Ez bibêjim ku, hilmê bistînim;
lêvên xwe vekim ku bersivê bi-
dim.
21 Ez niha giramî ji şexsiyeta
tu kesî re nekim! Û ji mirov re
çaplûsî nekim.
22 Ji ber ku çaplûsî kirin çî ye,
nizanim; ya na, dê Afirkirê min
hema min bigirta û bibira!

33 Lê belê, niha ya Eyûb,
gotina min guhdarî bike û
guh bide hemû gotinên min!
2 A vay, niha devê xwe vekirim;
di nav devê min de zimanê min
dibêje.
3 Dê gotinên min, rastiya dilê min
bîne ziman û lêvên min, dê zanîna
xwe bi rastiya paqij ve bibêjin.
4 Ruhê Xwedê min afirand û hil-
ma Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike, min vejand.
5 Ger ji destê te ve bê, bersivê
bide min; gotinên xwe li ber min
rêz bike, li hemberî min bisekine!
6 A vay, ez jî mîna te qûlê Xwe-
dê me; ez jî ji heriyê ve hatim ava
kirin.
7 A vay, toqîna min te bêzar nake
û pestandina min li te giran nayê.
8 Rastî, gava min guhdarî dikir te
got û min gotinên te bihîst:
9 Ez paqij im, bêguneh im; bêsûc
im ez û di min de fesadî nîne!
10 A vay, ew bona min mahnê dibî-
ne; min ji xwe re neyar dihesibîne.
11 Lingê min li tomruxê dixe,
çavdêriyê ji hemû rêyên min re
dike!
12 A vay, ez bersivê bidim te, tu
di vêya de neheq î; ji ber ku, Xwe-
dê ji mirov ve mezintir e.
13 Tu çima bi wî re dikeve
keftûleftê? Madem ku bona yek
karê xwe jî bersivê nade.
14 Ji ber ku, mirov wî nebîne jî;
Xwedê bi rêyekê, heta bi du rêyî
dibêje.
15 Di xewnê de, di xewn û xeya-
la şevê de; gava xewekî giran li
ser mirov digire, di hênijîna ser
livînan de;
16 Wê gavê, guhê mirovan vedi-
ke û mora xwe li tiştên ku ji wan
re hatine hîn kirin dixe.
17 Bona ku mirov ji kirina wî ve-
gerîne û bona ku ji zilam ve kubrê
veşêre.
18 Canê wî ji kortalê û jiyana wî jî
bi şûrê helaq kirinê ve diparêze.
19 Li ser livînên xwe biêşan û di
nava hestiyên xwe de; bi keftûlef-
tek bê sekin tê perwerde kirin.
20 Û dilê wî ji nan ve dikerihe,
canê wî jî ji xwarina bi tahm ve.
21 Goştê wî duhule, dibe ku xuya
nebe û hestiyên wî yên ku xuyanî
nabin, derdikevin holê.
22 Û canê wî nêzîkî kortalê û ji-
yana wî nêzîkî kuştinkiran dibe[1].
23 Bona ku, ya ji bo mirov rast
e çî ye bigehîne; li cem wî ger
milyaketek, mehdervanek; ji he-
zaran yekî bimîne.
24 Wê gavê dê Xwedê xêra xwe lê
bike û bibêje: Wî ji daketina kortalê
ve xelas bike; min kefaretê dît!
25 Goştê wî ji yê zarok ve tezetir
dibe; vedigere rojên xwe yî ciwa-
niyê.
26 Ji Xwedê re dua dike, ew jî ji
wî razî dibe û bi kêfxweşiyê wecê

1 Milyaketên mirinê, an jî: Ruhstînan.

wî dibîne û rastiya wî vedigerîne
mirov.
27 Li cem mirovan disitirê û
dibêje:
Sûcekî kirim û rastiyê xwar kirim
û li min nehat.
28 Wî canê min, ji ketina kortalê
ve xelas kir û dê jiyana min rona-
hiyê bibîne.
29 A vay, bona ku canê wî ji kor-
talê ve bîne û bi tîrêja jîndaran ro-
nahî bibe.
30 Hemûya vana du caran, sê carî
Xwedê bi mirov re kar tîne.
31 Qenc guhdarî bike, ya Eyûb,
bibihîze; tu bêdeng bibe ku ez bi-
bêjim!
32 Ger tiştekî ku tu bibêjî hebe,
bersivê bide min; ji ber ez dixwa-
zim ku te bi heq derxînim.
33 Ger tune be, min guhdarî bike;
bêdeng bibe ku ez zanyariyê hînî
te bikim!

*Elîhû axaftina xwe didomîne*

34 Û Elîhû bersiva xwe do-
mand û got:
2 Ya mirovên bi zanyarî, gotinên
min guhdarî bikin! Û kesên xwe-
diyê zanînê, guh bidin min.
3 Ji ber ku guh gotinan diceribîne,
çawa ku polke xwarinê tahm dike.
4 Em ya ku heq e, bona xwe hil-
bijêrin; ya qenc çî ye, em di nava
hev de bizanibin!
5 Ji ber Eyûb dibêje ku: Ez salih
im û Xwedê heqê min ji destê min
ve stend.
6 Heqê min heye, lê dîsa jî
ez derewîn têm hesibandin; gu-
nehê min nîne, lê belê birîna min
bêçare[1]!
7 Kîjan zilam mîna Eyûb in? Qer-
fan mîna avê vedixwe!
8 Bi yên ku xerabiyê kirine re he-
valbendî dike û digere û tevî zi-
lamên xerab dimeşe.
9 Ji ber ku dibêje: Bi Xwedê ve li
hev kirin, qenciyê nade mirov!
10 Ji ber vêya, ya mirovên bi
fêhmkarî! Min guhdarî bikin;
heşa ku Xwedê xerabiyê bike û
Yê ku hêza wî têra her tiştî dike,
neheqiyê pêk bîne!
11 Ji ber ku karê wî dide zilam û
ji her kesî re, li gor rêya wan dide
dîtin.
12 Belê, Xwedayê rasteqîn xera-
biyê nake û Yê ku hêza wî têra her
tiştî dike, ya rast xwar nake.
13 Ma kî rûyê erdê emanetî wî
kir? Û kî wî danî ser hemûya
dinê?
14 Ger dilê xwe vegerîne ser xwe,
ger ruhê xwe û hilma xwe, di hun-
dirê xwe de bicivîne.
15 Hemû afir, dê pev re hilma
xwe yî dawîn bidin û dê mirov
dîsa vegere axê.
16 Ger di te de fêhmkarî hebe,
vêya guhdarî bike; guh bide go-
tinên min!

[1] An jî: Te bi tîra xwe min birîndar kir.

17 Çawa! Ma yê ji dadiyê ve di-
keribe, qet serweriyê dajo? Û
tuyê, bona yê Bidad û Mezinî bi
xerabî bibêjî?
18 Ew ê ku, ji qiralekî re: Tu bi
kêr nayê! ji began re: Hûn xerab
in! dibêje.
19 Ew ê ku, guh nade şexsê sero-
kan û dewlemend ji xizan ve zê-
detir nahesibîne! Ji ber ku ew gişt
karên destê wî ne.
20 Di nava demekê de dimirin,
qewm di nîvê şevê de dilerize
û derbas dibe, diçe û yên xwurt
jî bêyî dest lêxistinê tên girtin û
birin.
21 Ji ber ku çavên wî li ser rêyên
zilam in û hemû gavên wî dibîne.
22 Tarî nîne û siya mirinê nîne
ku, bila yên xerabiyê kiribin xwe
li wir veşêrin.
23 Ji ber, bona ku were ber Xwe-
dê, dadgehê bona zilamekî bi kûrî
lêkolînê nake.
24 Bê lêkolîn zilamên xwurt
dişkîne û li dêvla wan hinekên din
diçikîne.
25 Ji ber ku bi karên wan dizane
û şevê bi ser û binî dike ku, die-
ciqin.
26 Ji ber ku xerab in, li wan dixe,
li ber çavên temaşekiran.
27 Ji ber ku li pêy wî çûnê ve
şaş bûne û rêyekî wî jî nehesiban-
dine.
28 Qêrîna xizanan gîhandin wî û
hawara zebûnan bihîst.
29 Gava ew rawestîne, ma kî di-
kare bê aram bike? Û gava wecê
xwe buxumîne, ma kî dikare wî
bibîne? Dixwaze li dijî netewekî
bin, dixwaze li dijî zilamekî bin,
gişt yek in.
30 Bona ku mirovê bêbawerî qi-
raletî neke, bona ku ji qewm re
nebin dafik;
31 Ji ber, ma yekî ku ji Xwedê re
bibêje: Min cezayê xwe kişand,
êdî xerabiyê nakim heye?
32 Ya ku nedîtime, tu hînî min
bike; ger neheqiyê kiribim, carekî
din nakim?
33 Ma li gor xwestina te yî dide,
ku tu wî red bikî? Ji ber ku yê hil-
bijêre tu yî, ne ez im;
wê gavê zanîṇa te çî ye? bibêje!
34 Dê zilamên bi fêhmkarî ji min
re bibêjin û her zilamên bi zanyarî
yên ku min guhdarî dikin, dê bi-
bêjin:
35 Eyûb ji nezaniya xwe ve dibêje
û gotinên wî, bêqîmet in.
36 Mîna zilamekî xerab be,
xwezîka ji ber bersivên xwe;
ceribandina Eyûb heta dawiyê
bidome!
37 Ji ber ku dijraberiyê tevî sûcên
xwe dike; di nava me de li çepi-
ka dixe jî, gotinên xwe yî li dijî
Xwedê zêde dike.

*Elîhû bersiva xwe didomîne*

35 Û Elîhû bersiva xwe do-
mand û got:

2 Ma tu vêya rast dihesibînî?
Gelo te gotiye: Bilindahiya min ji
ya Xwedê zêdetir e?
3 Ji ber ku tu dibêjî: Ma dê çi fêda
wê ji te re bibî? Xeynî ya ku bi sûc
kirina xwe, zêdehiya ku ez bi dest
ve bixim, dê çi kara min bibûya?
4 Ez bersivê bidim te û tevî te ji
hevalên te re!
5 Li ezmanan binêre û bibîne; li
ezmanê jî binihêre, ew ji te bilind-
tir in.
6 Ger te sûcan kiribe, ya ku te ji
wî re kiriye çî ye? Û ger gunehên
te zêde bibin, ya ku te ji wî re ki-
riye çî ye?
7 Ger tu salih be, ya ku te dayiye
wî çî ye? An jî ya ku wî ji destê te
ve stendiye çî ye?
8 Xerabiya te, bona mirovên ku
mîna te ye yî; rastiya te jî, bona
lawê mirov e.
9 Ji zêdeyiya zordestiyê hawarê
dikin; ji ber hêza mezinan bangî
alîkariyê dikin.
10 Lê belê tu kes nabêje: Ka li
ku ye Xwedê, Afirkirê min? Ew
Xwedayê ku di şevê de murxan
dide!
11 Ji heywanên erdê zêdetir, zanînê
hînî me dike û me ji civîkên ezma-
nan pirrtir bi zanyarî dike.
12 Ji ber bitiriya[1] zilamên xerab,
li wir hawarê dikin û yê ku bersi-
vê bide nîne.
13 Rastî, Xwedê li hawara vala
guhdarî nake û Yê ku hêza wî têra
her tiştî dike, li wê nanihêre.
14 Di gava tu dibêje ku ez wî ne-
dîtime de jî, doz li ber wî ye û li
benda wî be.
15 Û niha, madem ku bi hêrsa xwe
ve sehêtiyê nekir, zêde guh nade
kubrê jî. 16 Bo vê yekê, Eyûb
devê xwe li cîhê vala vedike; bêyî
zanîn gotinên xwe zêde dike.

*Elîhû axaftina xwe didomîne*

36 Û Elîhû dîsa got:
2 Hinekî min berde ku ez
nîşanî te bidim; ji ber ku hîn gotinên
ku bona Xwedê bên gotin hene.
3 Ez ê zanîna xwe ji dûr ve bigi-
rim û bînim û ez ê heq bidim yê
ku min afirandiye.
4 Ji ber ku rastî, gotinên min ne
derew in; zilamek di zanînê de
gihîştî li ber te ye.
5 A vay, Xwedê bi qudret e û qet
kesî biçûk nabîne; di hêza fêhm-
kariyê de biqudret e.
6 Zilamê xerab najîne û mafê ze-
bûnan dide.
7 Çavên xwe ji salihan venagerî-
ne û tevî qiralên li ser textê ne,
wan abadîn dide rûniştin, ku bi-
lind dibin.
8 Û ger li zincîran ve bên xistin û bi
qeytanên zebûniyê ve bên girtin.
9 Wê gavê çi kirina wan, digehîne
wan û gunehên wan, bi kubrê ve
kirinên wan.

[1] Betran.

10 Guhên wan, bona şîretan vedi-
ke û bona ku ji xerabiyê vegerin,
emir dide.
11 Ger guhdarî bikin û qûlitiyê ji
wî re bikin, rojên xwe bi qencitiyê
ve derbas dikin;
salên xwe jî bi rihetiyê ve.
12 Lê belê ger guhdarî nekin, bi
şûr ve dê helaq bibin, hilma dawîn
jî bêyî zaniyariyê dê bidin.
13 Lê belê yên ji dil ve bêbawerî
bin, hêrsê kom dikin; gava wan
girê bide, bangî alîkariyê nakin.
14 Canên wan, di ciwantiyê de
diqedin; jiyana wan jî di nava re-
zîlan de.
15 Bi zebûniyan ve zebûnan xelas
dike û bi tengasiyê ve guhên wan
vedike.
16 Belê, dixwest ku te ji nava ten-
gasiyê ve bikişînî; cîhekî ne teng,
bi firehî û ya ku hatiye danînî sifra
te, dê bi rûnê ve tijî dibû.
17 Lê belê tu bi daraziya zilamê
xerab ve tijî yî; dadî û darazî bi te
re digire.
18 Lê belê baldar be, bila li dijî
perwerdebûnê, hêrs te ne kişkişîne
û meziniya kefareta te, te rêşaş
neke.
19 Ma bona ku tu tengasiyê
nekişîne qêrîna te; an jî hemû
xîretên hêza te bes in?
20 Şeva ku li cîhên xwe gel hatine
jêkirin; tu bêriya wê neke.
21 Qet berê xwe nede fesadê; ji
ber ku, te vêya ji zebûniyê ve se-
reta girt.
22 A vay, Xwedê bi qudreta xwe
ve karên bilind çê dike; ma yê ku
mîna wî dide hîn kirin kî ye?
23 Ma kî rêya wî bijart? Û kî ji wî
re dikare ku bibêje: Te neheqiyê
kir?
24 Di bîr bîne ku, divê tu karê wî
bilind bikî; karê ku mirov sitiran-
dine.
25 Hemûyên mirovan wî dîtine;
mirov ji dûr ve li wî dinêrin.
26 A vay, Xwedê çiqas mezin e!
Lê em wî fêhm nakin, lêkolîn li
hejmara salên wî ve nabe.
27 Ji ber ku dilopên avê bi jor ve
dikişînin, baranê ji hêlma wê ve
diçilkînin.
28 Ew barana ku ezman wê diri-
jîne û pirr û pirr li ser mirovan ve
diherikîne.
29 Belê, ma mirov dikare fêhm
bike belavbûna ewran; gurmîniya
çadira wî?
30 A vay, tîrêja xwe dide dora xwe
û kûraniyên behrê dadigrî.
31 Ji ber ku, bi vana daraziyê ji
neteweyan re dike; pirr û pirr
xwarinê dide.
32 Ew bi brûskê ve destên xwe
duxumînî û bona ku li nîşana xwe
bixe, emir dide wan.
33 Gurmîniya wî agahiya bahozê
dide, dewar jî agahiya hatina wî[1]
didin.

---

[1] An ji: ...ji yê ku bilind dibî, nûçeyê didin.

37 Dilê min ji vêya jî dilerize
û ji cîhê xwe ve dilîze.
2 Guhdarî bikin, gurmîniya dengê
wî guhdarî bikin û dengê wî yê ku
ji devê wî ve derdikevî!
3 Wê bi bin hemûya ezmanan ve,
birûska xwe jî bi nîçikên erdê ve
berdide.
4 Li pêy wê dengek digurme; bi
dengê rewnaqiya xwe ve digurme
û gava dengê wî bê bihîstin, nika-
re birûskan bisekinînî.
5 Xwedê bi dengê xwe, bi avayekî
şaşkirî digurmî; tiştên mezin, yên
ku em nikarin fêhm bikin dike.
6 Ji ber ku: Bikeve erdê! dibêje ji
berfê re; ji barana derbasbûyî re jî
û ji rêjneyên barana dijwar re.
7 Bona hemû mirovên ku afiran-
diye bizanibin; destê her kesî mor
dike û ji kar ve dihêle.
8 Heywan jî dikevin kemînên xwe
û di qulên xwe de rûdinin.
9 Ji odeya başûrê ve bahoz tê; ji
bakurê ve jî serma[1].
10 Bi hilma Xwedê ve qeşa[2] dibe
û firehiya avan teng dibe.
11 Belê, ewrê bi rewa ve bar dike,
ewra xwe yî birûskê belavî dorê
dike.
12 Û li ser rûyê dinya ku lê tê
rûniştin, bona her tiştî emirên ku
daye wan bikin; bi şandina wî di-
zivire, tê vedigerîn.
13 Dixwaze bona lêxistinê, di-
xwaze bona warê xwe; dixwaze
bona xêrê bike, wê dide rijandin.
14 Guh bide vêya, ya Eyûb; bi-
sekine û karên Xwedê yên ku şaş
dikin bifikire!
15 Xwedê çawa sazûmanê dixe
wan û birûska ewrê xwe çawa di-
biriqînî, ma tu dizanî?
16 Ma tu tewşa ewran û karên şaş
dike, yên ku di zanînê de bêkê-
masî ne, dizanî?
17 Gava bayê başûrê dinê bêdeng
dike; ma tu dizanî kincên te çawa
germ dibin?
18 Ma tu dikarî ezmanê mîna
mirêka tûncê darê jî zexm e; tevî
wî belav bikî[3]?
19 Ka em ê çi ji wî re bibêjin, hînî
me bike, bona ku ji ber tariyê, em
nikarin gotinên xwe têxin rêzê.
20 Ma bi gotin; ez dixwazim ku
bibêjim, dibe ku mirov agahiyê
bigehîne wî?
Ma mirov qet dixwaze bê daqur-
tandin?
21 Û niha tîrêja dibiriqe, ya ku li
ezmanê nabînin û ba derbas dibe
û wê paqij dike.
22 Biriqandina zêr ji bakurê ve
tê; rewnaqiya bi tirsîn li ser Xwe-
dê ye.
23 Yê ku hêza wî têra her tiştî
dike, em nikarin wî kifş bikin; di

1 Sar.
2 Cemed.
3 Biweşînî, an jî: Raxinî.

qudretê de ew bilind e û maf û da-
diya bitûmî, xwar nake.
24 Mirov bona wê ji wî ditirsin;
lê belê ew tu carî li yên ku xwe
bi xwe zaniyar dihesibînin na-
nihêre!

*Xwedê bersivê dide Eyûb*

38 Wê gavê, XUDAN ji nava
bahozê ve bersivê da Eyûb
û got:
2 Vî zilamê ku bi gotinên bê
zanîn; pesniyê reş dike kî ye?
3 Niha şûtika xwe li pişta xwe
bixe, mîna zilamekî; ez ji te bipir-
sim û tu jî ji min re bibêje!
4 Gava min bingehên dinê da-
tanîn, tu li ku derê bû? Bigehîne,
ger di te de fêhmkarî hebe!
5 Madem ku tu dizanî, kî pîvanên
wê danî? An jî kî ta bi ser wê ve
kişand?
6 Ma bingehên wê li ser çi ve ha-
tin kutandin? An jî kî kevirê wê yî
quncikê[1] danî?
7 Dema hîn sitêrkên sibehê pev
re disitiriyan û hemûya lawên
Xwedê bi kêfxweşiyê ve bang
dikirin.
8 An jî kî bi deriyan ve behran
girt; gava ji rehma dayikê derket
û pejiqî.
9 Gava min ewran ji wê re kirin
kinc û reş tariyê ji wê re kirin
qevdik,
10 Û gava sînora xwe jê re jê ki-
rim, derî û zendê danîm.
11 Û gava: Tuyê were vir û
derbasî wê de nebe û dê şepêlên
te yî betran li vir bisekinin
gotim?
12 Ma te di temena xwe de emir
da sibehê; ma te cîhê berbangê
hînî wê kir.
13 Da ku, bila bi seriyên erdê
ve bigire û jê ve yên xerab bên
weşandin û avêtin?
14 Şiklê wî tê guhertin, mîna he-
riyê di bin morê de yî û her tişt
mîna kincê dibiriqin.
15 Ji xeraban, tîrêjên wan tên
stendin û baskê ku hatiye rakirin
tê şikandin.
16 Ma tu gîhaşt heta çavkaniyên
behrê? An jî tù di biniyên balûpalê
de geriya?
17 Ma deriyên mirinê ji çavên te
re vebûne? Û te deriyên siya mi-
rinê dîtiye?
18 Ma te firehiya dinê fêhm kir?
Ger tu bi vana hemûyan dizanibî,
ji min re bigehîne!
19 Cîhê ku ronahî rûniştiye, rêya
wê li ku derê ye û tarî, cîhê wê ku
der e ku?
20 Tu wê bigirî û bibe heta sînorê
xwe û rêyên mala wê bizanibî?
21 Belê, tu dizanî, ji ber ku tu wê
demê bûbû û hejmarên rojên te
pirr in!
22 Ma tu ket xezîneyên berfê û te
xezîneya zîpikan dît?

---
1 Goşe, qorzik.

23 Ez wan bona dema tengasiyê,
bona roja ceng û şerê vedişêrim.
24 Ka li ku ye, rêya ku lê tîrêj tê
belav kirin, rêya ku bayê rojhilatê
lê belav dibe?
25 Ma kî bona şêlava baran
cihokê û bona birûskan rê vekir?
26 Da ku, bona li ser rêya bê mi-
rov, li ser çola ku tê de zilam nîne
bibarîne.
27 Bona çolê û cîhê tenha têr bike
û gîhayê teze bigehîne.
28 Ma bavê baranê heye? An jî
bavê dilopên xunava kî ye?
29 Qeşa ji rehma kî ve derket? Û
kî xûsikên ezmanan za?
30 Av mîna kevir tund dibin û
qeşa li wecê balûpalê dikeve.
31 Ma tu dikarî birca Perwînê
girê bidî, an jî tu dikarî qeydê
Oriyonê vekî?
32 Ma tu dikarî di demsalên wan
de bircan derxînî?
Û tevî zarokên wî tu karî rê nîşanî
hirçên mezin bidî?
33 Ma tu bi zagonên ezmanan ve
dizanî?
Ma tu dikarî hikumeta wê li rûyê
erdê ve damezirînî?
34 Ma tu dikarî dengê xwe bilin-
dî ezmanan bikî ku, bila pirraniya
avê te bigire?
35 Ma tu dikarî birûskan derxînî
ku, bila bigihêjin û ji te re: A vay,
em li vir in! bibêjin?
36 Kî zanyarî xist dil? An jî kî
fêhmkariyê da hiş?
37 Kî dikare ewran bi zanyariyê
ve bihesibîne? Û kî dikare meşkên
ezmanan vala bike?
38 Wê gava ku, erd mîna darêjê hişk
dibe û girêk bi hev ve dizeliqin?
39 Ma tù dikarî ji bona şêra mê,
nêçîrê bikî, an jî dikarî zikê şêrên
ciwan têr bikî,
40 Wê gavê ku di qulên xwe de
bêzar bûne û di nava kelemiyan
de ketine kemînê?
41 Kî nêçîra qijakê jê re ava dike?
Gava çêlikên wê, Xwedê bangî
alîkariyê dikin û gava bona xwa-
rinê di gerê de ne?

39 Ma tu dema zayina bizinên
çiyê dizanî? Tu li benda
dema zayîna xezala yî?
2 Mehên ku dagirtine tu dijmêrî?
An jî dema wanî zayînê tu dizanî?
3 Dirûxin û çêlikên xwe dizên, ji
êşên xwe ve xelas dibin.
4 Çêlikên wan xwurt dibin, li be-
yarê mezin dibin; derdikevin diçin
û carekî din jî venagerin.
5 Kî kerê hov bi beradayîtî şandiye
û kî qeyda kerê hov vedike?
6 Ew kerê ku min beyara wê, mala
wê û warê xwê kirim warê wê.
7 Ew bi teşqela bajêr ve dikene;
qêrînên ajotger jî nabihîze.
8 Bona ku ji xwe re bike xwarin,
çiyayan dike zad[1] û lêkolînê li her
celeb hêşinahiyê ve dike.

[1] An jî: Sixuretî li çiyayan dike.

9 Ma gayê kovî dê bixwaze ku
qûlitiyê ji te re bike? An jî li cem
afira te şevê diborîne?
10 Di qelşên haletê de tu dikarî
qeydê li gayê kovî bixî? An jî li
pêy te, di deştan de dê tirmixê
bikişîne?
11 Ma ji ber ku xwurt e, tu dikarî
bi wî ewle bibî? An jî, ma tuyê
karê xwe ji wî re bihêlî?
12 Ji ber ku dê zadê te bîne û ge-
nimê bêndera te dê bide hev tuyê
pê bawer bibî?
13 Bazikên heştirmê, bi xirûr ve
ba dibin; lê belê ev bazikana, ba-
zik û perîkên leglegê ne?
14 Ji ber ku hêkên xwe li erdê ve
dihêle û wan di nava tozê de germ
dike.
15 Û ji bîr dike ku, ling dikare
wan bieciqîne û heywanê beyarê
wan bipelixîne.
16 Tundiyê ji çêlikên xwe re
dike, mîna ku ne yê wê bin, li
cîhê vala kedê bikişîne jî xema
wê nîne.
17 Ji ber ku Xwedê, zanyariyê bi
wê re daye ji bîr kirin û di fêhm-
kariyê de parê nedaye wê.
18 Lê belê gava rabe û baz
bide, bi hesp û siwarê wê ve
dikene.
19 Ma te quwetê daye hespê? Û
damûska ku ba dibe, te li histuyê
wî kiriye?
20 Yê ku wî mîna kuliyekî hol
dike, ma tu yî? Dijwariya xorîni-
ya wî tirsehêz e.
21 Di deştê de bi lingê xwe ve
axê dikole û bi quweta xwe ve ji
kêfxweşiyê dicoşe;
bona pêşwaziya çekdaran derdi-
keve.
22 Bi tirs dikene û bêzar nabe û ji
ber şûrê venagere.
23 Li ser wî qewdanek tîran, rima
dibiriqe û nîze ditingin.
24 Bi hêrs û dijwariyê navberê
dadiqurtîne; gava dengê boriyê
bibe li cîhê xwe ve nasekine.
25 Her ku borî bê lêxistin: Hih!
dibêje û ji dûr ve bêhna cengê,
dengê digurme, yê serokan û
qêrînê dibihîze.
26 Ma bi zanîna te waşe[1] firînê
dike û ber bi başûrê ve bazikan
dişidîne?
27 Ma bi emrê te qertel bilind
dibe û hêlîna xwe li bilindahiyê
ava dike?
28 Li ser zinarê rûdine û qonax
datîne, li serê tûj yê zinarê û li
sertapa wê.
29 Li wir çavnêriyê li xwarina
xwe re dike; çavên wê ji dûr ve
dibînen.
30 Û çêlikên wê, xwînê daduqur-
tînin û ger berate li ku bibin, ew
jî li wir e.

40 XUDAN dîsa bersivê da
Eyûb û got:

1 Başok.

2 Ma yê ku karê Yê hêza wî têra
her tiştî dike, biçûk dibîne, bi wî
re dikeve keftûleftê?
Yên bi Xwedê re dikevin
keftûleftê, bila bersivê bidin!
3 Wê gavê Eyûb bersivê da XU-
DAN û got:
4 A vay, ez tiştekî bêqîmet im; ma
ez çi bersivê bidim te? Ez destê
xwe datînim ser devê xwe.
5 Carekê gotim û bersivê nadim û
du cara gotim û êdî nakim.
6 XUDAN ji nava bahozê ve ber-
sivê da Eyûb û got:
7 Niha mîna zilamekî şûtika xwe
li pişta xwe girê bide, ez ji te bi-
pirsim û tu ji min re bibêje!
8 Ma tuyê daraziya min li valahi-
yê jî derxînî? Bona ku tu bi maf-
dar bê dîtin, tu min bisûc dikî?
9 Ma mîna Xwedê mil bi te re
heye? Û tu dikarî bi dengekî mîna
wî bigurme?
10 Niha bi mezinahî û bilindahiyê
ve xwe bixemilîne û bilindahî û
mezinahiyê li xwe bike!
11 Xuroşiya hêrsa xwe vala bike û
li her bikubir re binêre û wî biçûk
bike. 12 Li her yê bikubir re binê-
re û wî têk bibe û li cîhê ku lê ne,
xeraban di bin lingan de bicû!
13 Hemûyan bi hev re di axê de
veşêre, li cîhê dizî bi pêçê ve wecê
wan bipêçe!
14 Wê gavê ez ê jî pesnahiya te
bidim, bi gotina destê te yî rastê
dikare te xelas bike.
15 A vay, binêre, nijdebaranê tevî
te afirandime; mîna ga gîhayê
dixwe!
16 A vay, binêre, quweta wî di
pişta wî de ye; qudreta wî jî di
masûlkeyên zikê wî de ye!
17 Teriya xwe mîna darê erzê
radike; rehên hêtên wî, hatine rê-
sandin.
18 Hestiyên wî boriyên ji tûncê ne;
parsuyên wî mîna darikên hesin e.
19 Berhema Xwedê ya serete ew
e; Afirkirê wî şûrê wî daye.
20 Rastî, çiya xwarina wî ji wî
re tîne; ew çiyayê ku hemû hey-
wanên beyarê li wir dilîzin.
21 Di bin kelemiyên Sîdrê de ra-
dikeve, li cîhê ku bi qamiran ve
nuxumandiye, li avzêlê.
22 Sîdre, wî bi siyên xwe du-
xumînin; biyên newalê dora wî
digirin.
23 A vay, ger şet bicoşe jî ew na-
tirse; ger Urdun heta devê wî rabe
jî ew bawer e[1]!
24 Ma gava ew binêre, kî dikare
bi wî bigire? Û bona xeleqan kî
dikare pozê wî qul bike?

41 Ma tu dikarî Levyatan[2] bi
şewkê ve bikişînî?

[1] Ewle ye.
[2] Levyatan: Bêkêmasî nayê zanîn ku ev heywanek çawan e; an dola wê qediya ye, an jî heywanek di mînakiya timsehê de, lê ji wê zehf mezintir e.

Û bi girêkê zimanê wê bişidînî?
2 Tu dikarî tayê ji delavgiyayî
têxe pozê wê? An jî bi çenqelkê
tu dikarî çenga wê qul bikî?
3 Gelo dê pirr li ber te bigerî?
An jî dê gotinên şêrîn ji te re
bibêjî?
4 Ma bi te re peymanê dibire ku,
tu her tim wê bi dîlitî bigirî?
5 Ma tu pê re dilîzî, mîna bi civîkê
re bilîzî? Û wê bona qîzên xwe
tuyê girê bidî?
6 Gelo taximê masîvanan danû-
stendina wê dikin? Wê di nava
bazirganan de par dikin?
7 Ma tu dikarî çermê wê bi çinga-
lan ve dagirî? Serê wê jî bi labûtên
masîvanan ve?
8 Destê xwe deyne ser wê; cengê
di bîra xwe de bîne û carekî din
meke!
9 A vay, bi wê ve hêvî girêdan
vala ye; ma bi xuyaniyek wê jî
mirov têk naçin?
10 Zilamekî dil zexm, yê ku wê
hişyar bike nîne û yê ku dê li ber
min dikaribe bisekine kî ye?
11 Ma yê ji berê ve dayiye min kî
ye, ku ez vegerînim û bidim wî?
Çi yî di nava hemûyê ezmanan de
hebe, ew yê min e.
12 Ji ber endamê wê û hêza wê ya
dijwar û ji ber xweşikiya wê, ez ê
gotina xwe qut nekim.
13 Kî dikarî ber kincê wê veke?
Kî dikarî têkeve nava her du
çengên wê?
14 Kî dikare, bazikên deriyê wecê
wê veke? Dor bi dor diranên wê
toqîn in.
15 Yê ku pê pesnê xwe dide, pe-
rikên wî yên dijwar in; bi mohra
ku bênavber lêxistine, hatine
girtin.
16 Yek pirr nêzîkî ya din e; qasî
ku hewa nekeve nava wan.
17 Pev re zeliqîne; yek bûne û
venaqetin.
18 Pişkîna wê tîrêjê belav dike;
çavên wê jî mîna mijankên
berbangê ne.
19 Ji devê wê ve pêtalên biagir
derdikevin û cirûskên agir dipen-
gizin.
20 Ji qulên pozê wê ve duh derdi-
keve; mîna ku ji qazanan dikele û
ji qamirên dişewitin derkeve.
21 Hilma wê koziran pê dixe û ji
devê wê ve pêt derdikevin.
22 Quwet di histuyê wê de radizê
û toqîn li ber wê dilîze.
23 Qetmerên goştê wê, pev re
zeliqî; li ser wê ve zeximîne; kil
nabin.
24 Dilê wî mîna kevir hişk e; belê,
mîna kevirê aşê, yê binî hişk e.
25 Gava ew rabe, yên xwurt ditir-
sin; ji ser xwe ve derbas dibin, ji
bêzariyê.
26 Ger bi ser wê ve bê çûyîn, şûr
kêrî tiştekî nayê; ne rim û ne nîze,
ne jî zirx.
27 Hesin ji wê re, mîna kapekê tê;
tûnc jî mîna êzingê pûç.

28 Tîr nikare wê birevîne; kevirên
qûsikê, bo wê mîna firo ne.
29 Bona wê doqik mîna firo ye; bi
êrîşa nîzê ve dikene.
30 Bin zikê wê, parîkên tûj yên
kûzê; mîna ku li ser heriyê ve cer-
cereyekê dirêj bikî.
31 Avên kûr mîna qazanekî di-
kelînî; behrê dike mîna sihûnê
melhemê.
32 Li pêy xwe, şopek dibiriqe ber-
dide; mirov dibêje ku qey balûpal
porekî sipî bûyî ye.
33 Li giravê mîna wê nîne, bona ku
tirsa wê tune be hatiye afirandin.
34 Çav li her tiştên bilind re bilind
dike; li ser hemû lawên xirûrê, ew
qiral e.

*Eyûb tobe dike*

42 Û wê gavê Eyûb bersivê
da XUDAN û got:
2 Tu dikarî her tiştî bikî, ez pê di-
zanim û mirazekî te jî nayê seki-
nandin[1].
3 Ev zilamê ku bi bêhayî daraziyê
tarî dike, kî ye? Ji ber vêya, tiştên
ku fêhm nekirime gotim;
tiştên şaşkirî ku ji min bilindtir in
û ez bi wan nizanim!
4 Ez lava dikim, min guhdarî bike
ku ez bibêjim: Ez ji te bipirsim
ku, tu ji min re bibêje!
5 Min ji bo te, ji guh ve bihîstibû;
lê niha jî çavên min te dîtin.
6 Ji ber vêya, ez xwe biçûk dibî-
nim û di xwelî û tozê de di tobe
kirinê de me!

*Eyûb ji bo Hevalên xwe dua dike*

7 Û ûsa bû ku, paşî XUDAN
van gotinana ji Eyûb re got, XU-
DAN ji Elîfazê Temanî re got: Li
hemberî te û li hemberî her du
hevalên te hêrsa min sor bû; ji
ber ku we mîna qûlê min Eyûb,
bona min ya rast negotin. 8 Niha
bona xwe heft ga û heft beranî
bistînin û herin cem qûlê min
Eyûb û bidin qewla ku bona we
hatiye pêşkêşî kirin, bila qûlê min
Eyûb, bona we dua bike; ji ber ku
ez bi wî ewle dibim ku, li dijî we,
li gor ehmeqiya we ji we re nekim;
ji ber ku we mîna qûlê min Eyûb,
bona min ya rast e negotin! 9 Û
Elîfazê Temanî û Bîldadê Şûahî
û Sofarê Naamayî çûn û mîna ku
XUDAN emir daye wan kirin û
XUDAN giramiyê ji Eyûb re kir.

*Eyûb vedigere Jiyanek nû*

Aqûp 5,11

10 Gava bona hevalê xwe dua kir,
XUDAN sirgûna Eyûb vergerand
û XUDAN, du qat zêde malên wî
yê berê da Eyûb.
11 Û hemû birayên wî û hemû
xwuşkên wî û hemûyên ku wî
ji berê ve dinasiyan[2], hatin cem

[1] An jî: Nayê girtin.

[2] An jî: Hemûyên ku ji berê ve naskiriyê wî ne.

wî û di mala wî de, tevî wî nan
xwarin.
Û ji ber hemû bêtarên ku
XUDAN anîne serê wî, bi par
kirina jana wî, xemrevîniyê li
wî kirin û her yekî pariyekî zîv[1]
û xelikek zêr dan wî. 12 Û XU-
DAN, dawiya Eyûb ji pêşiya wî
zêdetir berdar danî û çardeh he-
zar mîhê wî û şeş hezar deve û
hezar cot gayên wî û hezar kerê
wî yên mê bûn. 13 Û heft law û
sê qîzên wî jî bûn. 14 Û navê qîza
xwe yî yekemîn Yemîma û ya du-
wemîn Ketsiya û ya sêwemîn jî
Keren-Hapûk danî. 15 Û li
hemûya welêt ve, mîna qîzên
Eyûb, pîrekên xweşik nehatin
dîtin û bavên wan di nava birayên
wan de mêrasê da wan.
16 Û paşî vêya Eyûb sed û çel sal
jiya û law û zazên xwe dît, çar
nifşe. 17 Eyûb pîrbûyî û bi rojan
ve têrbûyî mir[2].

1 Pariyek zîv: Bi Îbranîtî: Kesitayek. Kesitayek menek pere ya qîmet û giraniya wê nayê zanîn bû.

2 An jî: Çû li ser dilovaniya xwe.

# ZEBÛR

*Pêşgotin*

Zebûr (bi navê Mezmûran jî tête zanîn) pirtûkek qesîde û duayan e. Di navbera demekî dirêj de ji aliyê cûreyê nivîskaran ve hatiye nivîsandin. Îsraêlî van dua û qesîdeyan di peristinê xwe de bi kar dianîn.

Em dikarin van qesîdeyan bi çend beşan ve cihê bikin: Qesîdeyên peristin û pesnahiyê ye, lawijan; duayên ku bona alîkarî, parastin û xelasiyê têne kirin; lavayên bona bexşandinê; bona pîrozkirina Xwedê qesîdeyên şikiryê; xwestekên bona bicezakirinên neyaran. Ev duana li ser navê kes û netewê dihatin kirin. Hinek ji van duayan hestên mirovan yên kûr derdixistin holê, hinekan jî hest û hewcedariyên gelê Xwedê tînin ziman.

Zebûr pirtûka helbesta ye. Taybetiya helbesta Îbranî ya herî tê zanîn; hevrastbûyîn e. Hevrastbûyîn; mijara di rêza yekemîn de, di rêzên duwem an jî sêwem de bi awayên cuda tête dubare kirin. Rêzên duwem an jî sêwem jî eynî mijarê bi awayekî dijber pêşve dibe, şayeser dike, an jî digihêjîne bandevê.

Zebûrên 9+10, 34, 37, 111, 112, 119 û 145'an mîna akrostîşê hatine nivîsandin, yanê ayet li gor dorê bi tîpên elîfba Îbraniyan dest pê dikin.

## PIRTÛKA YEKEMÎN (1)

### Zebûr 1

1 Xwezî li wî mirovî ku, bi şîreta xeraban ve nameşe û di rêya gunehkaran de nasekine û di nava qerfokan de rûnane.
2 Lê zewqa xwe ji Zagona XUDAN distîne û şev û roj li ser wê kûr difikire!
3 Yê ûsa mîna darê li ber keviya çeman hatiye çandinê ye, mêwa xwe di demsala xwe de dide
û tu carê pelên wî naçilmisin û di her karên ku dike de serfiraz e.
4 Yên xerab ne ûsa ne: ew mîna qirşê kayê yê di ber bayê de diçe ne.
5 Bo vê sedemê, dema yên xerab bên daraz kirin safî nabin û

di civaka rastan de cîh ji xwe re
nabînin.
6 Ji ber ku XUDAN rêya rastan
dizane; lê rêya xeraban tune dibe.

**Zebûr 2**

1 Çima netewe tevlihev dibin
û çima gelan pêşniyarên vala
dikin?
2 Qiralên dinê bi rêz dibin û serok
yek dibin, li hemberê XUDAN û
qiralê ku wî mesh kiriye:
3 Em qayîşên wan biqetînin!
dibêjin: Girêkên wan ji ser xwe
bavêjin!
4 Xudanê li ezmanan rûniştî dike-
ne, henekê xwe bi wan dike.
5 Pişt re bi hêrs wan îkaz dike,
bi xezeba xwe wan dixe tirsekê
mezin.
6 Û dibêje: Min qiralê xwe, li çi-
yayê xwe yî pîroz, li Siyonê bi cîh
kiriye!
7 Ez ê fermana XUDAN bidim
îlan kirin: Ji min re got: Tu lawê
min î, ez îro ji te re bûm bav.
8 Ji min bixwaze û ez bi mêrasî
netewan û bi milkî çar hawirdorê
dinê bidim te.
9 Tuyê bi şiva hesinî wan bişikîne[1],
mîna feraxên axînî perçe bike.
10 Ya qiralno, baqil bin! Ya se-
rokên dinê, dersê bigirin!
11 Bi tirs xizmetê ji XUDAN re
bikin û bi lerizandinê kêfxweş
bibin!
12 Law ramûsînin ku bila hêrs
nebe, ya na hûn ê di rêya ku hûn li
pêy diçin de helaq bibin.
Ji ber ku hêrsa wî di derbikê de
geş dibe. Xwezî li hemû kesên ku
xwe spartine wî!

**Zebûr 3**

1 Zebûra ku dema Dawid ji lawê
xwe Abşalom reviyaye, nivîsiye.
Ya XUDAN! Neyarên min çiqas
zêde bûn, kesê ku li dijî min serî
hildane zêde ne!
2 Gellekan bona canê min dibêjin:
Di qatê Xwedê de bona wî xelasî
nîne! (Sela[2].)
3 Lê belê tu, ya XUDAN, tu li
dora min mertal î, mezinahiya
min, yê ku serê min bilind dike
tu yî.
4 Ez bi dengê xwe bangî XUDAN
dikim û ji çiyayê xwe yî pîroz,
bersivê dide min. (Sela.)
5 Ez dirêj dibim û radikevim;
hişyar dibim, radibim, ji ber ku
XUDAN ji min re alîkar e.
6 Tirsa min nîne, ji neyarên bi deh
hezaran hawirdora min girtine.
7 Ya XUDAN, rabe! Ya Xwedayê
min, min xelas bike! Ji ber ku te

1 Bişikîne: Di nivîsên Suryanî û Septûaginta de, bi gotina, (tuyê mîna pezan) bajo derbas dibe.
2 (Sela.): Mana vê gotina bi zimanê Îbranîtî bitûmî nayê zanin. Usa tê fêhm kirin ku, terimek di mûsîkê de tê mana rawestinê ye.

li çenga hemû neyarên min xist,
diranên xeraban şikand.
8 Xelasî ji XUDAN e; bila bere-
keta te li ser gelê te be! (Sela.)

**Zebûr 4**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazê
têlî, Zebûra Dawid e. Dema bangî
te bikim, bersivê bide min, ya
Xwedayê minî bi dad! Dema ez
têkevim tengasiyê, min derdixinî
firehtiyê, ji min re keremkariyê
bike û dua min bibihîze!
2 Ya lawên mirovano, ka heta çi
wextî, hûn ê bilindahiya min ve-
gerînin şermiyê? Heta kengê hûn
ê dil bidin tiştên vala? Û li pêy de-
rewan baz bidin? (Sela.)
3 Bizanibin ku XUDAN qûlê xwe
yî dilsoz, ji xwe re cihê kiriye!
Kengê ez bang bikim, dê XU-
DAN min bibihîze.
4 Bi tirs bilerizin û gunehan mekin!
Li ser livînên xwe, di dilên xwe de
qenc bifikirin û hiş bin[1]! (Sela.)
5 Qurbanên rastiyê pêşkêşî XU-
DAN bikin û bi wî ewle bibin!
6 Pirr kes dibêjin: Ka kî wê qenci-
yê şanî me bide? Ya XUDAN, bi
şewla wecê xwe me ronî bike!
7 Te kêfxweşiyek ûsa da dilê min
ku, ji kêfxweşiya ku ew ji zadê pirr
û xemra teze distînin, hîn jî zêdetir.
8 Ez di nava dilxweşiyê de dirêj
dibim û radizêm; ji ber ku tenê tu,
ya XUDAN, di nava ewledariyê
de min didî rûniştandin.

**Zebûr 5**

1 Bona serekê mûsîkê. Bona
Neyê, Zebûra Dawid e. Guh bide
gotinên min, ya XUDAN, nalînên
min bibihîze!
2 Li qêrîna min guhdar be, ya Qi-
ral û Xwedayê min! Ji ber ku dua-
ya min ji te re ye.
3 Tu sibehê dengê min dibihîze,
ya XUDAN, ez her sibê duaya
xwe pêşkêşî te dikim û bi hêvî li
bendê dimînim.
4 Ji ber, tu ne Xwedayê ku ji xera-
biyê hez dike ye, şer nikare li cem
te bisitire.
5 Yên qure nikarin li ber çavên te
bisekinin; tu ji hemûyên ku fêsa-
diyê dikin dikerihî.
6 Tu, kesên derewan dibêjin
tune dikî, ya XUDAN, tu ji yên
destên wan bi xwîn û xapînokan
dikerihe.
7 Lê ez, bi saya xêra te ya zêde,
têkevim mala te. Ez ê bi hurmet
ber bi perestgeha te yî pîroz ve
xwar bibim.
8 Li hemberî neyarên min, bi ras-
tiya xwe rê nîşanî min bide, ya
XUDAN! Rêya xwe li pêşiya min
rast bike.
9 Ji ber ku di devê wan de rastî
tune; dilê wan bi xerabiyê ve tijî,
devê wan, her yek tirbekî vekirî
ye; gotinên xwe serrast dikin.

---
1 Bêdeng bin.

10 Ya Xwedê, wan bi sûc derxîne;
bila sazûmana ku wan ava kirin,
bibe rêya têkçûna wan! Ji ber dij-
raberiya wanî bêhejmar wan bi-
qewirîne! Ji ber ku li dijî te serî
hildane.
11 Bila her kesê ku xwe bi te si-
tirandiye kêfxweş bibin; her tim
qêrînên dilxweşiyê bavêjin û ba-
zikê xwe li ser wan veke, bila yên
ji navê te hez dikin, bi kêfxweşiyê
di te de bicoşin.
12 Ji ber ku tu kesê rast pîroz dikî,
ya XUDAN, dora wî bi kerema
xwe mîna mertalekî dipêçî.

**Zebûr 6**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazên
heyşt têlî[1], Zebûra Dawid e. Ya
XUDAN, bi hêrs bi min re nexe-
yide, bi xezebê min nîne rê! Û bi
hêrsa xwe, min perwerde neke!
2 Ji min re dilovaniyê bike, ya
XUDAN, ji ber ku ez bê hal im!
Şîfayê bide min, ya XUDAN, ji
ber ku hestiyên min dilerizin!
3 Û canê min jî zehf dilerize; ax,
ya XUDAN! Dê ev heta kengê
bidome?
4 Vegere ya XUDAN, canê min
xelas bike; ji ber xêra xwe alîkari-
yê bi min re bike!
5 Ji ber ku, kes di nav miriyan de
te di bîra xwe de naynin; ma kî ji
te re şikiryê pêşkêş dike, ji warê
miriyan?
6 Bi nalînê ve ez qediyam; ez di
hemûya şevê de giriyam, doşega
min di nava avê de ye, livînên
min ji hêstirên çavên min şil û
pil in.
7 Ji keserê, ronahiya çavên min
ditefe, ji ber neyarên min, çavên
min qels dibin.
8 Ya kesên xerabiyê dikin, li dûrî
min bisekinin! Ji ber ku XUDAN
dengê giriyê min bihîst.
9 XUDAN, libergerîna min bihîst;
XUDAN dua min qebûl kir!
10 Dê hemû neyarên min
bişermin û dê tirs bi hemûyan bi-
gire; ew ê şunda vegerin, dê nişka
ve şermezar bin!

**Zebûr 7**

1 Şîgayona[2] ku Dawid di derheqê
gotinên Kûşê Benyamînî de ji
XUDAN re xwendiye.
Ez xwe disipêrim te, ya XUDAN,
Xwedayê min; min ji kesên ku bi
pêy min ketine xelas bike û azad
bike!
2 Ya na, dê mîna şêrekî canê min
perçe bikin û kesî ku min xelas
bike nîne,
3 Ya XUDAN, Xwedayê min!
Ger ez vêya kiribim: Ger di destê
min de neheqî hebe,

1 Bi sazên heyş têlî: Bi Îbranîtî, li gor ya heyştemin, mana wê bi biryarî nayê zanin.

2 Şigayon: Terimek mûsîkê... Mana wê bi tümî nayê zanin.

4 ger xayîntiyê bi hevalê xwe re
kiribim û bê sedem neyarê xwe
tazî kiribim, 5 Bila neyar bi pêy
min bikeve û min bigire; li erdê
canê min bieciqîne û bilindahiya
min bigire bin lingan. (Sela.)
6 Bi hêrs rabe, ya XUDAN! Li
dijî hêrsa neyarên min bisekine!
Û bona min hişyar bibe!
Te emrê hukum da.
7 Bila komela netewan li dora te
rêz bibin û ji bo wan dîsa vegere
qatê xwe yî bilind!
8 XUDAN netewan daraz dike;
min jî daraz bike, ya XUDAN, li
gor rastî û duristiya min ya ku li
cem min e.
9 Ya Xwedayê bi dadî! Bila da-
wiya xerabiya xeraban bê, lê yên
rast bigihêjin ewledariyê! Tu ku,
dilan û gurçikan diceribîne.
10 Xwedê mîna mertalekî li cem
min, dilpaqijan ew xelas dike.
11 Xwedê dadgerek bi dad e û
Xwedêyek ûsa ye ku, her roj hêr-
sê diweşîne.
12 Ger mirov neyên ser rê, ew
şûrê xwe tûj dike û kevana xwe
datîne û wê amade dike.
13 Çekên wî yên kuştinê amade
disekinin; tîrên xwe bi agir dike.
14 A vay, mirovê xerab janên fe-
sad dikişîne û ji xerabiyê ve du-
canî maye, derewê dizê!
15 Bîrikê vedike û dikole û ew bi
xwe dikeve bîra ku kolaye.
16 Dê xerabiya wî, bê serê wî û
zordariya wî dakeve ser wî.
17 Ji bo dadiya wî, ji XUDAN re
şikiryê bikim û bi Zebûran pes-
nahiya navê XUDANê bilind bi-
dim.

**Zebûr 8**

1 Bona serekê mûsîkê. Li ser
Gîtîtê[1], Zebûra Dawid e. Ya Xu-
danê me XUDAN; di hemûya
rûyê erdê de çi navekî te yî bilind
heye, te rûyê ezmanan bi rewna-
qiya xwe ve dagirt!
2 Bi devê zarokan, heta bi dengên
pitikan, te qudretê ava kir; bona
ku dijminan û tolgirtan bêdeng
bikî.
3 Dema ez ezmanên ku berhemên
tilîkên[2] te ne, heyv û stêrkên ku te
danîne li wê derê, temaşe dikim;
dibêjim: 4 Mirov çî ye ku, tu wî
bi bîr tîne? Û lawê mirov çî ye ku,
tu têkiliyê bi wî re deyne?
5 Te wî ji milyaketan ve hinek jî
nizm kir û taca şan û şerefê[3] danî
serê wî.
6 Te wî, li ser berhemên destê
xwe serwer danî, her tiştî li bin
lingê wî raxist.
7 Hemû mîh û gayan û heywanên
hov jî.

---

[1] Gitît: Dibe ku terimek mûsîkî, an jî: Qesideya ku dema tirî guvaştinê tê dixwîne be.

[2] An jî: Destên.

[3] An jî: Taca bilindahî û rûmetê.

8 Civîkên li ezmanan û masiyên
di behrê de, hemû afirên di behrê
de dilîzin.
9 Ya Xudanê me XUDAN; di
hemûya rûyê erdê de çi navekî te
yî bilind heye!

**Zebûr 9**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma Mirina Law de, Zebûra Dawid
e. Ya XUDAN, ez ê bi hemû dilê
xwe şikiryê ji te re bikim; hemû
nuwazeyên ku te kirine, ez ê bi-
bêjim.
2 Ez ê di te de kêfxweşiyê bibî-
nim û bicoşim, pesnahiya navên
te bi Zebûran bidim, ya Bilindê
Bilindan!
3 Dema neyarên min şunda vedi-
geriyan, li ber te tilpekî dibûn û
dimirin.
4 Ji ber ku te maf û doza min pa-
rast, tu wekî darazkirê bi dad li ser
textê rûniştî!
5 Tu bi netewan ve xeyidî, te xe-
raban tune kir; heta bêdawîbûnê,
te navê wan ji holê rakir.
6 Neyar heta bêdawîbûnê tune
bûn û çûn! Te bajarên wan ji rehê
ve helkişand, heta bîranînên wan
jî tunebû çû.
7 Lê belê XUDAN, heta
bêdawîbûnê serweriyê dajo,
bona daraziyê textê xwe ava
kiriye.
8 Û ew bi rastiyê rêvebiriyê li
dinê bike, ew bi dadî netewan da-
raz bike.
9 Û XUDAN, bona lawazan si-
targehek, di rojên teng de kele-
hek e.
10 Û yên ku navê te dinasin, bi
te ewle ne, ji ber ku te yên berê
xwe dane te, tu carî neterikand, ya
XUDAN!
11 Bi Zebûran pesna XUDANê li
Siyonê rûdine bidin! Kirinên wî
di nava gelan de belav bikin!
12 Ji ber ku, yê mafê xwîna rijan-
dî dipirse wê di bîr bîne, qêrîna
lawazan ji bîr nake.
13 Bila heyfa te li min bê, ya
XUDAN! Ya yê min ji qeraxa
mirinê ve xelas kiriye! Li derdê
ku ez ji ber kesên ji min dikerihin
dikişînim, binêre!
14 Ûsa ku, ez karên te yî liyaqî
pesnahiyê bibêjim, bi xelasiya
ku te di deriyê keça Orşelîmê de
daye ve dilxweş bibim!
15 Netewe ketin bîra ku bi xwe
kolane; lingê wan li tora ku
veşartibûn çerixî.
16 Xwedê, bi daraziyên xwe yî
dadî xwe xuyanî kir. Xerab ketin
dafika ku wan bi xwe avêtibûn.
(Hîgayon[1]. Sela.)
17 Dê xerab herin warê miriyan,
hemû neteweyên ku Xwedê ji bîr
kirine jî.

1 Hîgayon: Terimek mûsîkê, ya mana wê bi biryarî nayê zanin.

18 Ji ber yên xizan dê her tim
neyên ji bîr kirin, hêviya lawazan
heta bêdawiyê winda nabe.
19 Rabe, ya XUDAN! Bila mirov
serdest nê; bila netewe li ber te
bên daraz kirin!
20 Tirsê li wan bireşîne, ya XU-
DAN! Bila netewe bizanibin ku,
ew bi tenê mirov in! (Sela.)

**Zebûr 10**

1 Ya XUDAN, çima tu dûr
dimînî, çima di rojên teng de xwe
vedişêrî?
2 Yên xerab bi xirûrê ve nêçîra
belengazan dikin; bila bi xwe
bikevin dafika ku wan ava kirine.
3 Ji ber mirovê xerab pesnên xwe
bi xwestekên dilê xwe dide û mi-
rovê çav birçî naletê ji XUDAN
re dike, wî biçûk dibîne.
4 Mirovê xerab, yê ku xwe eci-
bandiye, dibêje: Xwedê nagere.
Tim dibêje: Xwedê nîne û hemû
fikrê wî ev e!
5 Rêyên wî her tim dibe serfirazi-
yê, daraziyên te ji wî pirr bilindtir
in; ew li dijî hemû neyarên xwe
har dibe.
6 Di dilê xwe de dibêje: Ez nale-
rizim û: Tu carî nakevim tengasi-
yê.
7 Devê wî tijî nalet, hîle û zilm e,
di bin zimanê wî de xerabî û fe-
sadî veşartiye.
8 Li dora gundan kemînan ava
dike, çavên wî, bi dizîka li yên
bêçare dinêrin; yê bêsûc di cîhê
veşartî de dikuje.
9 Li cîhên bi dizî kemînê davêje,
mîna şêrê di nava deviyan de;
bona ku bigre, li benda belengaz
disekine. Û wî dixe tora xwe û
digire.
10 Ew xwar dibe, çok dide û bêça-
re di bin pencikên wî yên bihêz de
dikevin.
11 Mirovê xerab di dilê xwe de
dibêje: Xwedê ji bîr kir. Wecê
xwe nuxumand, tu carî nabîne!
12 Rabe, ya XUDAN! Destê xwe
rake ya Xwedê! Belengazan ji bîr
meke!
13 Çima bila mirovê xerab Xwe-
dê biçûk bibîne û di dilê xwe de:
Xwedê hisab napirse, bibêje?
14 Lê tu, yê êş û tengasiyê
dikişînin dibîne; bona alîkariyê
bikî, wan temaşe dikî; yên bêçare
xwe disipêrin te, alîkarê sêwiyan
tu yî!
15 Baskê xerab û neheq bişkîne û
bila ji xerabiya wî, tu hisabê ne-
hatiye pirsîn nemîne!
16 Dê XUDAN, heta bêdawiyê
qiral bimîne; netewe ji welatên wî
tune bûn.
17 Bona ku tu mafê sêwî û belen-
gazan bidî, ya XUDAN, te xwes-
teka lawazan bihîst.
18 Tuyê dilên wan zexm bikî,
guhên xwe ji wan re veke; da ku,
mirovê ji axê ye, êdî bila tirsehêz
nebe.

**Zebûr 11**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra Da-
wid e. Ez xwe disipêrim XUDAN;
hûn çawa ji canê min re dibêjin:
Mîna civîkan bireve çiyayên xwe?
2 Binêre, yên xerab kevanên xwe
dikişînin, bona di tariyê de, li mi-
rovê dilpaqij bixin, tîrên xwe di-
xin jihê xwe.
3 Gava bingeh xera bibin, ma mi-
rovê rast dikare çi bike?
4 XUDAN di perestgeha xwe yî
pîroz de ye; XUDAN, texta wî li
ezmana ye, çavên wî hemû mi-
rovan dibîne, pêlûyên çavên wî
lawên mirovan diceribîne.
5 XUDAN mirovê rast diceribîne;
lê belê ji yê xerab û yê zordariyê
hez dike jî dikeribe.
6 Dê agirê sor û kewkurdê bibarî-
ne ser xeraban; tasa ku bikeve
para wan, dê bayê kizirandinê be.
7 Ji ber ku XUDAN bidadî ye û
ji dadîbûnê hez dike; dê mirovên
rast, wecê wî bibînin.

**Zebûr 12**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazên
heyşt têlî, Zebûra Dawid e. Xe-
las bike, ya XUDAN! ji ber ku
kesî dilsozî te nema; ji ber ku mi-
rovê dilsoz, di nava mirovan de
tune bûn.
2 Her kes ji cînarê xwe re derewan
dibêje, durûyî û çaplûsî dikin.
3 Bila XUDAN devê hemû
çaplûsan bigire, zimanên wan, yê
ku tiştên mezin dibêje, ji ser xwe
ve çûyî.
4 Ew ku: Em bi zimanên xwe qe-
zenc dikin, lêvên me di bin emrê me
de ne; efendiyê me kî ye? dibêjin.
5 Ji ber ketina belengazan û nalî-
na xizanan, XUDAN dibêje: Ez ê
niha rabim û wî bixim xweşiya ku
wî bêriya wê kiriye!
6 Gotinên XUDAN, gotinên pak
in; mîna zîvê ku di tendûra axînî
de hatiye hulandin û heft carî ha-
tiye safî kirin in.
7 Tu wan biparêze, ya XUDAN!
Her tim ji vê nifşeya xerab ve dûr
bigire.
8 Dema nemerdî di nav lawên mi-
rovan de qîmetê dît, xeraban dest
pê kir û li her alî geriyan.

**Zebûr 13**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ka heta kengê, ya XU-
DAN, ma qey heta bêdawîbûnê
tuyê min ji bîr bikî? Heta çi wextî
tuyê wecê xwe ji min veşêrî?
2 Dê heta kengê di canê min de
xem, di dilê min de her tim keser
hebe? Heta çi wextî neyarê min,
dê li dijî min serdest derkevin?
3 Rewşa min bibîne, ya XUDAN,
bersivê bide min Xwedayê min!
Çavên min ronahî bike ku, ez
nekevim xewa mirinê.
4 Da ku, neyarê min nebêje: Min
wî mexlûb kir! Û dema ku ez leri-
zîm, bila neyarên min şa nebin.

5 Lê ez bi xêra te ewle me; bila
dilê min bi xelaskirina te bicoşe.
6 Ez ê murxan ji XUDAN re bi-
bêjim, ji ber ku wî qenciyê bi min
re kir.

**Zebûr 14**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Bêaqil di dilê xwe de
dibêje: Xwedê nîne! Mirovan xe-
rabûn, erjengî girt û meşiya, yê ku
qenciyê dike tune ye.
2 Ûsa bû ku, XUDAN, ji ezma-
nan ve li mirovan nihêrt; bona,
gelo ka yekî baqil û li Xwedê di-
gere heye?
3 Hemû ji rê ve derketin, pev re
mindar bûn, yê qenciyê dike nîne,
ne tenê kesek jî!
4 Ma qey zanîna hemûyên sûcan
dikin nîne? Mîna nan bixwin,
gelê min dixwin, li ber XUDAN
nagerin.
5 Li wê derê bi tirsek mezin
tirsiyan, ji ber ku Xwedê li cem
nifşeya salihan e!
6 We xiyalê yê belengaz vala der-
xistin, lê belê XUDAN sitargeha
wî ye.
7 Xwezîka xelasiya Îsraêlê ji
Siyonê bê! Dema XUDAN
gelê xwe ji sirgûnê şunda bîne,
dê Aqûp kêfxweş bibe û Îsraêl
bicoşe.

**Zebûr 15**

1 Zebûra Dawid e. Ya XUDAN,
kî ji çadira te mêvan dibe? Kî di-
kare li çiyayê te yî pîroz rûne?
2 Yê ku jiyanek bêqisûr didome û
têkiliyên wî bi dadî ye û rastiyê ji
dil ve dibêje.
3 Mirovê ûsa ku bi zimanê xwe
buxtanê[1] nake, bi hevalê xwe xi-
rabiyê nake û reşiyê navêje stuyê
cîranê xwe.
4 Mirovên sernewq biçûk dibî-
ne, lê belê hurmetê nîşanî kesên
ji XUDAN ve ditirsin dide; ger ji
zirara xwe re sondê bide jî, ji son-
da xwe venagere.
5 Perê xwe nade selefê û li dijî
bêsûcan bertîlê nastîne. Yê ku
vana dike, tu carî nalerize.

**Zebûr 16**

1 Miqdama[2] Dawid e. Min bi-
parêze ya Xwedê, ji ber ku ez xwe
disipêrim te!
2 Canê min, te ji XUDAN re got
ku: Xudanê min tu yî; xeynî te tu
kêfxweşî bona min nîne.
3 Dema em bên pîrozên li rûyê
erdê, ew sergewre[3] ne; zewqa min
her tim di wan de ye.
4 Dê derdê kesên ku li pêy îla-
hekî din direvin, zêde bibe; ez
pêşkêşiya wanî xwînê narijînim û
navên wan nagirim devê xwe.

1 Îftira.
2 Miqdam: Terimek mûsîkî an jî edebî.
3 Esilzade.

5 XUDAN para mêrasa min û tasa
min e; para min di destê te de ye.
6 Çi derên xweşik ketin para
min[1], belê, çi mêrasek minî nu-
waze heye!
7 Ez pesnahiyan pêşkêşî XU-
DANê şîretan dide min, dikim,
dilê min heta şevan jî hînî min
dike.
8 XUDAN her tim danîm pêşiya
xwe, qet nalerizim; ji ber ku ew li
aliyê minî rast ve sekiniye.
9 Bo vê yekê, hundirê min bi
kêfxweşiyê ve tijî û dilê min
dicoşe, dê bedena min jî di nava
ewledariyê de rihet bike.
10 Ji ber ku tu min terkî qebrê
nakî; tu destûr nade ku qûlê te yî
dilsoz birize.
11 Tu rêya jiyanê xuyayî min dikî,
li hizûra te kêfxweşiya zêde heye;
ji destê te yê rastê dilxweşî kêm
nabe.

**Zebûr 17**

1 Duaya Dawid e. Ya XUDAN,
rastiyê guhdarî bike; qêrîna min
bibihîze! Guh bide duaya ku ji
lêvên minî bê hîle derdikeve!
2 Bila heqê min ji ber te derkeve;
ji ber ku tu rastiyê dibînî!
3 Te dilê min ceriband, bi şev
hêçand; te min ceriband, tu tiştekî
xerab nedît; ez bi biryar im, ji devê
min gotinek xerab dernakeve.
4 Gava em bên tiştên ku mirovên
din dikin; ez li pêy gotina lêvê te
çûm û ji rêyên zordariyê reviyam.
5 Bi gavên zexm bi rêyên te gir-
tim, lingên min neşemitîn.
6 Min bangî te kir; ji ber ku tu
bersivê dide min, ya Xwedê. Guh
bide min, gotinên min guhdarî
bike!
7 Xêra xwe yî nuwaze rê min
bide, ya yê xwe disipêrin te, wan
bi destê xwe yî rast ji êrîşkiran xe-
las dikî!
8 Min mîna bîbokên çavan bi-
parêze; di bin siya bazikên xwe
de min veşêre.
9 Ji êrîşa xeraban, ji neyarên
kuştinê, yên ku dora min girtine.
10 Dilê wan bez girêdayê, bi de-
vên xwe bi xirûr dibêjin.
11 Şopa me dîtin, bi ser me ve
tên; bona ku me li erdê bixin, çav-
nêrîtiyê dikin.
12 Ew wekî şêrekî ku dixwaze
perçe bike û mîna şêrekî ciwan, ê
ku kemînê avêtiye ye.
13 Rabe, ya XUDAN! Pêşiya
wan bibire, serê wan xwar bike!
Bi şûrê xwe canê min ji yê xerab
ve xelas bike.
14 Bi destê xwe, ji van mirovan
ya XUDAN, ji van mirovên ku
para wanî jiyanê li vê dinê ye!
Tu zikê wan bi cezayên ku tu bidî
têr bike. Ew ji zarokan têr bûne û
yê ji bermayî, ji zarokên xwe re
dihêlin.

1 An ji: Benên minî pîvanê ketin ser cîhê xweşik.

15 Lê belê ez ê bi saya rastiyê
wecê te bibînim, dema hişyar bi-
bim, bi dîtina wecê te têr bibim.

**Zebûr 18**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawidê qûlê XUDAN e. Roja ku
XUDAN, Dawid ji lepên hemû
neyarên wî û ji destê Saûl xelas
kir, Dawid vê murxê ji XUDAN
re got: Ez ji te hez dikim, hêza
min tu yî, ya XUDAN!
2 XUDAN zinarê min, sitargeh û
xelaskerê min e; Xwedayê min,
zinarê min û sitargeha min e, mer-
tala min, xelaskerê minî xwurt û
sitargeha min e!
3 Ez bangî XUDANê ku liyaqî
pesnahiyê ye dikim û ji neyarên
xwe ve xelas dibim.
4 Ez bi tayê mirinê ve hatibûm girê-
dan û şêlava têkçûnê min girtî bû.
5 Qeytanên warê miriyan min gir-
tibû, kemînên mirinê derketibûn
pêşiya min.
6 Di nava tengasiyê de, ez li ber
XUDAN geriyam, bona alîkariyê
bangî Xwedanê xwe kirim,
di perestgeha xwe de dengê
min bihîst û qêrîna min gîhaşt
guhên wî.
7 Wê çaxê rûyê erdê lerizî û kil
bû, kilbûn û lerizîn bingehên çi-
yan jî, ji ber ku ew hêrs bûbû.
8 Ji pozê wî dû bilind bû û ji devê
wî agirek kizirandinê û pêtên sor
avêt.
9 Pêlê ewrên reş kir û ezman
qelişand û daket jêr.
10 Û li kerûbekê siwar bû û hilfi-
riya, bazikê bayê girt û bi lez hat.
11 Tariyê li xwe nuxumand,
reşiya avê û ewrên reş ji xwe re
kir çardax.
12 Ji şewla hebûna wî, ji ewran
zîpik û pêtên bi agir diweşiyan.
13 Û XUDAN ji ezmanan ve
gurmiya, Bilindê Bilindan dengê
xwe da bihîstin, bi zîpik û pêtên
bi agir.
14 Û wî tîrên xwe reşand, neyarên
xwe belav kir û bi avêtina birûs-
kan wan xera kir.
15 Û kûrahiya behran hatin xuya
kirin û bingehên rûyê erdê derket
eşkeretiyê, ya XUDAN, ji ber pe-
kandina te, ji hilma bi hêzî ji pozê
te derdiket.
16 Wî ji jor ve destê xwe dirêj kir
û min girt, min ji avên kûr ve der-
xist.
17 Ji neyarê minî xwurt û ji
yên ku ji min dikerihin, min xelas
kir; ji ber ku ew ji min xwurttir
bûn.
18 Di roja minî asîwê de li ber
min sekinîn, lê belê XUDAN bû
alîkarê min.
19 Û wî, ez gîhandim aramiyê,
xelas kir, ji ber ku ji min dilxweş
ma.
20 XUDAN berdêla rastiya min
da, min li gor destên minî paqij bi
xelat kir.

21 Ji ber ku, ez di rêya XUDAN
de meşiyam û ji Xwedayê xwe bi
dûr ketinê ve xerabiyê nekirim.
22 Ji ber ku hemû seretayên wî
dam ber çavan, ji qaîdeyên wî qet
neqetiyam.
23 Û ez di çavê wî de bêqisûr
bûm û min xwe ji sûckirinê ve
da alî.
24 Bo vê yekê, XUDAN li
gor rastiya min û destên minî
di çavên wî de paqij in, min bi
xelat kir.
25 Tu bi yê dilsoz ve dibî dilsoz,
bi yê kamil ve kamil dibî.
26 Bi yê pak ve pak dibî û bi yê
xwar re, têkiliyên xwar datînî.
27 Ji ber ku tu gelê dilnizm xelas
dikî û seriyê kesê ji jor ve dinihê-
re xwar dikî.
28 Çavkaniya ronahiya min, tu yî,
ya XUDAN, Xwedayê min! Tu
tariya min ronî dikî.
29 Xwedayê min, ez bi alîkariya
te êrîşî êrîşkeran dikim û bi te
dîwarê kelehan derbas dibim.
30 Rêya Xwedê bêqisûr e; gotina
XUDAN pak e. Ew mertalê her
kesê ku xwe sipartiye wî ye.
31 Ma xeynî XUDAN, Xwedê
heye? Ma xeynî Xwedayê me, zi-
nar heye?
32 Xwedê min bi hêzê ve dixe-
milîne û rêya min bêqisûr dike.
33 Mîna yên xezalan, lingan da
min û min di bilindahiyan de di-
sekinîne.
34 Şer kirinê hînî destên min kir,
ji bo ez bi baskên xwe, bi kevana
tûncî bigirim.
35 Û te mertala serfiraziyê da
min, destê te yî rast, alîkirê min e
û dilnizmiya te, min bilindtir kir.
36 Tu cîhên ku ez pêlên xwe ba-
vêjim, fireh dikî û lingên min
naşemitin.
37 Min bera wan da û ez gîhaştim
neyarên xwe û heta ku hemû tune
nebûn, ez venegeriyam.
38 Wan eciqandim û nikarin rabin,
li bin lingên min hatin raxistin.
39 Ji ber ku te bona şer, min bi
hêz ve xemiland, yên ku li dijî
min rabûn, li ber min raxist erdê.
40 Te piştên neyarên min bi min
ve da zîvirandin û yên ku ji min
dikerihin tune kirim.
41 Ew qêriyan, lê belê yekî ku xe-
las bike derneket; bangî XUDAN
kirin, lê belê wî bersiv neda.
42 Wê demê, wan eciqandim, bûn
mîna toza ber bayê, mîna heriya
kuçan, bi wan girtim û avêtim.
43 Te min ji keftûlefta gel ve xelas
kir, min kir serokê netewan; gelên
ku ez wan nas nakim, qûlitiyê ji
min re dikin.
44 Çawa ku bihîstin, guh dan go-
tinên min; yên xerîb çaplûsiyê ji
min re kirin.
45 Lawên xerîban bêhêz in û bi
lerizîn ji kelehên xwe derketin.
46 XUDAN dijî! Bila pesnahî
ji zinarê min re be! Û bila Xwe-

dayê xelaskeriya min hîn jî bi-
lindtir be!
47 Û ew Xwedayê ku tola min
distîne û gelan bi min ve girê dide.
48 Yê ku min ji neyarên min ve
xelas kir, belê, min li hemberê dij-
raberên min serdest kir, ji destê
zordaran azad kir!
49 Bo vê sedemê, ez ê di nava ne-
tewan de şikiryê ji te re bikim, ya
XUDAN, bi Zebûran pesnahiya
navê te bidim.
50 XUDAN, qiralê xwe digihîne
serfiraziyên mezin, heta bêdawîbûnê
xêrê nîşanî qiralê ku mesh kiriye,
Dawid û nîjada wî dide.

**Zebûr 19**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra Da-
wid e. Ezman, rewnaqiya Xwedê
eşkere dikin û quba ezman, berhe-
ma destên wî dide bihîstin.
2 Roj ji rojê re gotinê dibêje û şev
zanînê dide şevê.
3 Ne gotin derbas dibe li wir û
ne jî axaftin, lê dengên wan nayê
bihîstin.
4 Lê belê gotinên wan li rûyê erdê
digerin, axaftinên wan digihêje
çar hawirdorê dinê, bona rojê, wî
li ezmanan çadirek ava kir.
5 Roj mîna zavê ku ji gerdegê ve
derdikeve ye û mîna egîtekê dest
bi revê bike, kêfxweş dibe.
6 Ji aliyekî ezman derdikeve, ve-
digere aliyê din, ji germiya wê qet
tiştek nayê veşartin.
7 Zagona XUDAN rayedar e, canê
nû dike, şahdeyiya XUDAN dil-
soz e; hîkmetê dide mirovê xêvik.
8 Qaîdeyên XUDAN rast in, dil
kêfxweş dikin, fermana XUDAN
pak e, çavan ronî dike.
9 Ji XUDAN ve tirsîn pak e; heta
bêdawiyê dimîne. Seretayên XU-
DAN rast in, bi tûmî dadî ne.
10 Mirov ji zêran, ji zêrên saf û
pirr zêdetir dixwaze; ew ji hun-
giv û hungivê dakirî yê kewarê
şêrîntir e.
11 Qûlên te îkaz dikin; xelata yên
ku li pêy wan biçin mezin e.
12 Kî dikare çewtiyên xwe bibî-
ne? Li qisûrên min î, yên ku ne-
dîtime biborîne!
13 Qûlên xwe ji gunehên ku bi zanîn
hatine kirin jî biparêze! Destûr nede
ku serweriyê ji min re bikin! Wê
çaxê ez ê ji dûrî serîhildana mezin,
bêqisûr û kamil bibim.
14 Bila gotinên ji devê min der-
kevin û ramanên di dilê min de, li
ber te qebûl bibînin[1]. Ya XUDAN,
zinarê min û xelaskerê min[2]!

**Zebûr 20**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Bila di rojên te yî teng

[1] Bên qebûl kirin, an jî: Meqbûl bibin.
[2] Xelaskerê min: Ya bi gotina Xelasker hatiye wergerandin, bi Îbranîtî Goel e û tê mana merivê nêzîk (Binêr. Rût 2:20)

de, XUDAN bersivê bide te,
bila navê Xwedayê Aqûp, te bi-
parêze!
2 Ji cîhê pîroz ve, alîkariyê ji te
re bişîne û ji Siyonê ve ji te re alî-
kar be.
3 Bila hemû pêşkêşiyên te yî
zadî di bîr bîne û qurbanên te yî
şewitandinê qebûl bike! (Sela.)
4 Bila li gor dilê te bide te û hemû
pêşniyarên te rast bike!
5 Wê demê em ê serfiraziyên te bi
qêrînên kêfxweşiyê pîroz bikin û
bi navê Xwedayê xwe, alên xwe
biçikînin, bila XUDAN hemû
xwestekên te bîne cîh!
6 Niha fêhm kirim ku, XUDAN,
qiralê ku mesh kiriye xelas dike;
bi hêza xelaskeriya destê xwe yî
rast, ji ezmanên xwe yî pîroz, ber-
sivê dide wî.
7 Hinek kes, baweriya xwe bi
erebeyên xwe yî şer û hinek kes
jî bi hespên xwe tînin; lê belê em
navê XUDAN, Xwedayê xwe bi
bîr tînîn
8 Ew xera dibin, dikevin, em jî ra-
dibin û ripîrast disekinin.
9 Ya XUDAN, xelas bike! Roja
ku em bang bikin, bila qiral ber-
sivê bide me!

**Zebûr 21**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ya XUDAN, qiral bi
hêza ku te daxuyakirin kêfxweş
dibe û bi serfiraziya ku te daye,
çiqas pirr bi kêfxweşiyê ve
dicoşe!
2 Te xwestina dilê wî da û xwes-
teka ku ji devê wî derket, red ne-
kir. (Sela.)
3 Ji ber ku bi xelatên qenc, tu der-
ket pêşwaziya wî, te tacekî safî
zêrînî danî serê wî.
4 Ji te jiyanê xwest, te da wî; belê,
jiyanek dirêj û bê dawî.
5 Bi serfiraziya ku te peyda kir,
gîhaşt bilindahiyek mezin; te wî
bi rewnaqî û mezinahiyê ve xe-
miland.
6 Ji ber ku her tim te bereketê bi
ser wî ve barand, bi hebûna xwe,
wî xist kêfxweşiyek mezin.
7 Ji ber ku qiral bi XUDAN ve
ewle ye û bi saya xêra Bilindê Bi-
lindan nalerize.
8 Dê destê te bigihêje hemû ne-
yarên te, destê te yî rastê dirêjî
kesên ku ji te dikerihin bibe.
9 Dema tu hêrs bibe, ya XUDAN,
tuyê wan bikî mîna firneyekî sor
bûyî û bi xezeb daqurtînî û bi agir
ve biqedînî.
10 Tuyê dexlên wan ji rûyê erdê
tune bikî û nifşeyên wan ji nava
mirovan ve.
11 Ji ber ku bona te dek û
dolab ava kirin, bona xapandinê
dixebitin, dîsa jî nikarin serfiraz
bibin.
12 Ji ber ku dema tu kevana xwe
ber bi wan ve bikşîne, tuyê pişta
wan wergerîne.

13 Bi hêza xwe, bilindahiya xwe xuya bike, ya XUDAN! Em dixwazin murxan bibêjin û bi Zebûran pesnahiya qudreta te bidin!

## Zebûr 22

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqama Xezala Berbangê de, Zebûra Dawid e.
Xwedayê min, Xwedayê min, te çima min terikand? Çima bona alîkariya min û ji guhdana qêrîna min dûr disekinî?
2 Ya Xwedayê min! Ez bi roj bang dikim, tu bersivê nadî min û bi şev bang dikim, dîsa aramî ji min re nîne.
3 Lê belê tu pîroz î! Yê ku li ser pesnahiyên Îsraêlê text ava kiriye, tu yî.
4 Kalikên me, bi te bawer bûn; xwe sipartin te û te wan xelas kir.
5 Gaziyê ji te re kirin û xelas bûn; bi te ewle bûn û neşermiyan.
6 Lê belê ez ne mirov, kurmê axê me, mirov min biçûk dibînin, gel jî kêm dibîne.
7 Her kesê ku min dibîne, henekê xwe bi min dike, bi qîçbeşkirinê ve serî kil dikin û dibêjin ku:
8 Pişta xwe sipart XUDAN! Ka bila wî xelas bike, em bibînin. madem ji wî hez dike, bila alîkariyê pê re bike!
9 Lê belê yê min ji rehma dayikê derxist û di himbêza dayikê de hînî bi te ewle bûnê kir tu yî.
10 Ji bûyîna xwe ve, min sipartin te; ji rehma dayika xwe ve Xwedanê min tu yî!
11 Ji min dûr nemîne! Ji ber ku tengasî nêzîk e, kesekî alîkariyê bike nîne.
12 Pirr boxan li der dora min girtin, gayên Başan yên har dora min digirin.
13 Mîna şêrên bi gurmîniyê nêçîrên xwe parî parî dikin, devê xwe ji min re vedikin.
14 Ez mîna avê dirijim û hemû hestiyên min, ji cîh ve derdikevin, dilê min mîna şimayê di hundirê min de duhule.
15 Hêza min, mîna pariyek kûzê ziwa bû û zimanê min bi pidiyê min ve dizeliqe û te min di axa mirinê de dirêj kir.
16 Kûçik dora min digirin, keriya xeraban dora min digire, wan destên min û lingên min qul kirin[1].
17 Ûsa bûme ku, hemû hestiyên xwe dijmêrim, çavên xwe bel dikin û li min dinêrin.
18 Kincên min di nava hev de par dikin û bona kirasê min jî vijagê davêjin.

---

[1] Gotina qul kirin, ya di nivîsên Septûagînta Suryanî de û di hinekên Îbranîtî de derbas dibe. di gellek nivîsên Îbranîtî yên din de bi gotina mîna şêran derbas dibe.

19 Lê belê tu ya XUDAN, dûr ne-
sekine! Ya hêza min, bona alîkari-
ya min baz de!
20 Canê min ji şûr, jiyana min ya
yekta ji pencikên kûçik ve xelas
bike!
21 Min ji devê şêr ve xelas bike!
Belê, te ji qiloçên gayê bejî ve,
bersivê da min!
22 Ez navê te ji birayên xwe re
bidim bihîstin; di nava civatê de
pesnahiyan pêşkêşî te bikim!
23 Ya hûn, kesên ji XUDAN ve
ditirsin, pesnahiyan pêşkêşî wî
bikin! Ya hemû nîjada Aqûp, wî
bilindtir bikin! Ya hemû nîjada
Îsraêlê, ji wî bitirsin!
24 Ji ber wî tengasiya ku belen-
gaz dikişîne, biçûk nedît û ji wî
nekerihî, wecê xwe neda alî; lê
belê dema bona alîkariyê bangî
wî kir, wî bihîst.
25 Di civaka mezin de tuyê bibe
babeta pesnahiya min, ez ê li ber
kesên ji te ditirsin qurbanên xwe
pêşkêş bikim.
26 Dê lawaz bixwin û têr bibin,
yên ku berê xwe dane XUDAN,
dê pesnahiyê pêşkêşî wî bikin;
bila heta bêdawiyê dilê we bijî!
27 Dê çar aliyê rûyê erdê di bîr
bîne û vegere XUDAN û hemû
nîjadê netewan, li ber wî bi dev û
rû herin erdê.
28 Ji ber ku serwerî, ya XUDAN
e û ew rêvabirtiya netewan dike.
29 Dê li rûyê erdê hemû dewle-
mend têr bibin û li ber wî secde
bikin; hemûyên diçin axê û yên
neketine ber mirina xwe, dê li ber
wî xwar bibin.
30 Dê nifşeyek were, qûlitiyê ji
wî re bike; dê Xudan ji nifşeyên
werin re bê têgîhandin.
31 Dê werin dadiya wî û bi gotina:
XUDAN vana çêkir! Ji gelekî hê
nebûye re bidin bihîstinê.

**Zebûr 23**

1 Zebûra Dawid e. XUDAN şivanê
min e; kêmasiya min çê nabe.
2 Min di mêrgên hêşîn de dike
mexelê; min di qeraxên avên bi-
aram de dimeşîne.
3 Canê min nû dike; di oxra navê
xwe de, di rêyên rast de pêşengiyê
ji min re dike.
4 Ger ez di nava newala mirinê
ya tarî de derbas bibim jî, ji xera-
biyê natirsim; ji ber ku tu bi min
re yî. Çoyê te û gopalê te ewle-
dariyê didin min.
5 Tu sifrê li pêşiya neyarên min, ji
min re ava dikî; rûn di serê min de
didî; tasa min ji ser ve diçe.
6 Belê, di hemûya temena min de
dê tenê qencî û xêr li pêy min bê
û ez ê her tim di mala XUDAN
de rûnim.

**Zebûr 24**

1 Zebûra Dawid e. Yên XUDAN
in, rûyê erdê û yên hundirê wê,
dinya û yên li ser dijîn.

2 Ji ber ku ew e, yên li ser behrê
wê ava kiriye û li ser avê wê di-
sekinîne.
3 Ma kî dikare derkeve çiyayê
XUDAN? Û kî dikare li cîhê wî
yî pîroz bisekine?
4 Yê destê wî pak, dilê wî paqij
e, dilê xwe nedaye derewan û bi
derewê sond naxwe.
5 XUDAN yê ûsa pîroz dike, Xe-
laskerê wî Xwedê wî pak dike.
6 Yên berî bidin wî, nifşeya ku
li wecê te digerin e – ev Aqûp e!
(Sela.)
7 Ya derîno, serê xwe bilind bikin!
Vebin, ya deriyên bêdawîn! Bila
Qiralê Bilind bikeve hundir!
8 Kî ye ev Qiralê Bilind? Ew XU-
DAN e, xwurt û egît, XUDANê
di şer de egît e!
9 Serê xwe bilind bikin, ya derîno!
Vebin, ya deriyên bêdawîn! Bila
Qiralê Bilind bikeve hundir!
10 Kî ye ev Qiralê Bilind? XU-
DANê serwerê hemû hêzan, Qi-
ralê Bilind ew e! (Sela.)

**Zebûr 25**

1 Zebûra Dawid e. Ya XUDAN,
ez canê xwe ji te re bilind dikim.
2 Ya Xwedayê min, ez bi te bawer
im, min şermezar neke, bila neyarên
min hoqehoqê kêfxweşiyê nevêjin!
3 Belê, tu kesê ku hêviya xwe bi
te ve girêdayiye, nakeve şerme-
zariyê; kesên bê sedem xayîntiyê
dikin, dê şerm bikin.
4 Ya XUDAN, rêyên xwe xuyayî
min bike, aliyên xwe hînî min
bike!
5 Di rêya xwe yî rast de pêşengiyê
ji min re bike û min perwerde
bike, ji ber Xwedayê ku min xe-
las kiriye tu yî; di hemûya rojê de
hêviya min di te de ye.
6 Ya XUDAN, dilovanî û xêra
xwe, di bîra xwe de bîne, ji ber ku,
ew ji berî bêpêşiyê de wekhev in.
7 Gunehên minî ciwanî, serîhil-
danên min di bîr nîne; li gor hez-
kirina xwe, min di bîr bîne; ji ber
ku tu qenc î, ya XUDAN!
8 XUDAN qenc û rast e; bona
vêya, rê li nîşanî gunehkaran
dide.
9 Di rêya dadiyê de, pêşengiyê ji
dilnizman re dike û rêya xwe hînî
wan dike.
10 Hemû rêyên XUDAN, li xêr
û rastiyê sipartiye, bona kesên li
pêy emirên di peymana wî de ye,
diçin.
11 Ya XUDAN, li oxra navê te,
sûcê min efû bike, ji ber ku sûcê
min mezin e!
12 Mirovê ku ji XUDAN ditirse,
kî ye? Dê rêya ku hilbijêre, ew
nîşanî wî bide.
13 Canê wî, di nava dewlemendi-
yê de bijî û nîjada wî jî dê welêt
mêras bistîne.
14 XUDAN raza xwe, bi kesê ku
ji wî ditirsin re par dike û peyma-
na xwe, ji wan re daxuyanî dike.

15 Çavên min her tim li XUDAN
in; ji ber ku ew lingên min ji torê
derdixe.
16 Li rewşa min binêre, dilovani-
yê ji min re bike; ji ber ku ez xerîb
û belengaz im.
17 Tengasiyên dilê min zêde di-
bin, min ji derdê min ve xelas
bike!
18 Li derd û keserên min binêre û
li hemû gunehên min biborîne!
19 Li neyarên min binêre, ji ber
ku, ew çiqas zêde bûn û çawa jî ji
min dikerihin!
20 Canê min biparêze û min xelas
bike! Min nebe xeyal şikestinê, ji
ber ku ez xwe disipêrim te!
21 Bila rastî û duristî min biparêze,
ji ber ku hêviya min di te de ye.
22 Ya Xwedê, Îsraêlê ji hemû ten-
gasiyên wî xelas bike!

**Zebûr 26**

1 Zebûra Dawid e. Min bi heq
derxîne, ya XUDAN! Ji ber ku ji-
yanek durist ajotim û bi XUDAN
ve ewle bûm û nalerizim.
2 Min biceribîne, ya XUDAN,
îmtihan bike, dil û gurçikên min
biceribîne.
3 Ji ber ku xêra te, her tim li ber
çavên min e û di rastiya te de di-
jîm.
4 Ez bi derewînan re rûnanim û bi
durûyan re nameşim.
5 Ji civaka xerabiyê dikin ve di-
kerihim û bi fesadan re rûnanim.
6 Bona ku bêsûcbûna xwe xuyanî
bikim, destê xwe dişom û li dora
pêşkêşgeha te dizivirim, ya XU-
DAN.
7 Bona bi dengekî bilind şikirya
xwe bidim guhdarî kirin û bona
hemû nuwazeyên te bibêjim.
8 Ya XUDAN, ez ji mala ku tu tê
de dijî hez dikim û ji cîhê ku rew-
naqiya te lê ye.
9 Canê min bi gunehkaran ve û
jiyana min, bi zilamên bi xwîn ve
nede hev!
10 Destên wan, haletê xerabiyê
ne û destê wanî rastê tijî bertîl e!
11 Lê belê ez durist dijîm; min
xelas bike û dilovaniyê ji min re
bike!
12 Lingê min li cîhê zexm di-
sekine. Ez ê di nava Civakê de
pesnahiyan pêşkêşî te bikim, ya
XUDAN!

**Zebûr 27**

1 Zebûra Dawid e. ronahî û xe-
lasiya min XUDAN e, ma ji kê
bitirsim?
XUDAN qudreta jiyana min e,
ma ji kê bêzar bibim?
2 Xerabên ku dijminên min û
neyarên min in, dema bona ku
goştê min bixwin, bi ser min ve
hatin; tilpekî bûn û ketin.
3 Ger li dijî min artêşek jî qonax
bê, dilê min natirse; li dijî min,
dê şer bê vekirin, dîsa ewledariya
xwe winda nakim.

4 Ji XUDAN ve tiştek xwestim,
ji wî digerim: Temaşe kirina
xweşikya XUDAN û bona di Pe-
restgeha wî de heyranî wî bibim,
di hemû rojên temena xwe de, di
mala XUDAN de bisekinim[1].
5 Ji ber ku ew ê di roja xerab de
min di çardaxa xwe de veşêre, di
cîhê çadira xwe yî ewle de veşêre,
dê min derxîne ser zinarekî bi-
lind.
6 Û wê çaxê li dijî neyarên minî
dora min girtine, dê serê min bi-
lind bibe, ez ê bi kêfxweşiyê bi-
qêrim û di çadira wî de qurbanan
pêşkêş bikim û pesnê wî bi murx
û Zebûran bidim.
7 Ya XUDAN, ez li ber te dige-
rim, guh bide dengê min û bi ke-
rema xwe bersivê bide min!
8 Ji hundirê xwe ve dengekî bihîs-
tim: Te got: Li wecê min bigere!
A vay, ez li wecê te digerim, ya
XUDAN.
9 Wecê xwe ji min veneşêre, qûlê
xwe bi hêrs şunda venegerîne!
Tu her tim ji min re bû alîkar;
min bernede û min neterikîne, ya
Xwedayê ku min xelas kiriye!
10 Dayik û bavê min, min bite-
rikînin jî, XUDAN min qebûl
dike.
11 Ya XUDAN, rêya xwe hînî min
bike û li dijî neyarên min, di rêya
rast de pêşengiyê ji min re bike!

[1] Rûnim, an jî: Derbas bikim.

12 Min bi kêfa neyarên min ve
bernede! Ji ber ku şahdeyên de-
rewîn li pêşiya min disekinin û
yê ku zorbariyê dike, dijwariyê
direşînin.
13 Tu şik û şupha min nîne ku,
ez ê di warê zindiyan de qenciya
XUDAN bibînim!
14 Hêviya xwe bi XUDAN ve
girê bide! Xwurt û bila dilê te
mêrxas be û hêviya xwe bi XU-
DAN ve girê bide!

**Zebûr 28**

1 Zebûra Dawid e. Ya XUDAN,
ez bangî te dikim; zinarê min,
guhê xwe ji dengê min re negre; ji
ber ku ger tu bêdeng bimîne, ez ê
bibim mîna miriyên ku dadikevin
kortala mirinê!
2 Dema bona alîkariyê bangî te
bikim, destê xwe li xaniyê te yî
pîroz re vekim; guh bide li ber-
gerînên min!
3 Min bi xeraban, bi yê neheqi-
yan dikin ve; nexe qatekê û bi
ceza neke! Ew bi dostî, bi cîranên
xwe ve diaxifin, lê belê di dilên
wan de xerabî heye!
4 Li gor lêkerên wan, li gor ku xe-
rabî kirinê wan, bersiva wan bide;
berdêla kirinên wan,
li gor xebatên destên wan bide
wan; tiştên ku li xwe heq kirine
bide wan.
5 Ji ber ku ew, qîmet nadin kirinên
XUDAN û berhemên destên wî,

bo vê sedemê, dê XUDAN wan
têk bibe û carekî din jî ava nake.
6 Bila pesnahî ji XUDAN re be!
Ji ber ku li bergerîna min bihîst.
7 XUDAN hêz û mertalê min e;
ez ji dil bi wî bawer im û alîkariyê
dibînim; dilê min dicoşe û bi mur-
xên xwe şikiryê ji wî re dikim.
8 XUDAN hêza gelê xwe ye, ke-
leha serfiraziya qiralê ku mesh
kiriyî ye.
9 Gelê xwe xelas bike û gelê xwe
yî heq pîroz bike û şivantiyê ji
wan re bike û wan abadîn hilgire!

**Zebûr 29**

1 Zebûra Dawid e. Ya lawên yê
bihêz, bidin XUDAN, rewnaqî û
qudretê bidin XUDAN!
2 Rewnaqiya navê wî, bidin XU-
DAN; di nava kincên pîroz de, bi
XUDAN ve biperistin!
3 Dengê XUDAN, li ser avan e;
Xwedayê bi rewnaq digurme,
XUDAN li ser avên balûpal e.
4 Dengê XUDAN, bihêz e, dengê
XUDAN bi rewnaq e.
5 Dengê XUDAN, darên serwî-
zadê dişkîne, belê, XUDAN ser-
wên Lubnanê perçe dike.
6 Û wan mîna golikê, Lubnanê
û Çiyayê Sîryonê jî mîna çêlika
gayê hov hol dike.
7 Dengê XUDAN, xuriya agir
davêje.
8 Dengê XUDAN, çolê dilerizîne;
XUDAN Çola Kadeşê dilerizîne.
9 Dengê XUDAN, xezalan dide
zayînê[1] û daristanan tazî dihêle û
di Peristgeha wî de her tişt: Bilin-
dahî! dibêjin.
10 XUDAN di ser tofanê de tex-
tê xwe ava kir û ew ê heta bê-
dawîbûnê qiral bimîne.
11 XUDAN hêz dide gelê xwe,
XUDAN gelê xwe bi dilxweşiyê
ve pîroz dike.

**Zebûr 30**

1 Qesîdeya ku dema perestgeh
gorî dikirin, dihat gotin; Zebûra
Dawid e.
Ez dixwazim ku te bilindtir bikim,
ya XUDAN; ji ber ku te min xelas
kir û neyarên min bi ser min de
nekenand.
2 Ya XUDAN, Xwedayê min!
Ez li ber te geriyam, te şîfayê
da min.
3 Ya XUDAN! Te canê min ji
warê miriyan derxist; te jiyanê da
min, min nexist kortala mirinê.
4 Ya kesên dilsozê XUDAN in,
bi Zebûran pesna XUDAN bidin,
pîroziya wî di bîr bînin û şikiryê ji
wî re bikin!
5 Ji ber ku hêrsa wî demek dajo.
lê xêra wî jî temenek e; dibe ku
êvarê hêsir birijin. lê belê bi si-
behê kêfxweşî tê[2].

1 Xezalan dide zayînê, an jî: Darberiyan xwar dike. 2 Bê, bibe, an jî: Bizê.

6 Dema ez bi aram bûm, gotim
ku: Ez heta bêdawiyan tev nali-
vim.
7 Ya XUDAN! Te bi xêra xwe, çi-
yayê min zexm kir; lê belê dema
te wecê xwe veşart, ez tirsiyam.
8 Ya XUDAN, min bangî te kir
û ez li ber Xudan geriyam: 9 Dê
çi qenciya xwîna minî rijandî ji
te re bibe, ger ez dakevim kortala
mirinê? Ma qey ax dê pesnahiyê
pêşkêşî te bike? Dê dilsoziya te
bang bike?
10 Guhdarî bike, ya XUDAN,
bila heyfa te bi min bê! Ya XU-
DAN, bibe alîkarê min!
11 Te şîna min vegerand şahiyê,
cilikên[1] min derxist û min bi
kêfxweşiyê ve xemiland.
12 Ûsa ku, bila dilê min pesna
te bi Zebûran bide û bê deng
nemîne! Ya XUDAN, Xwedayê
min, ez ê her tim şikiryê ji te re
bikim!

**Zebûr 31**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ya XUDAN, ez xwe di-
sipêrim te. Min tu carî şermezar
neke! Bi dadiya xwe min xelas
bike!
2 Guh bide min, zû bigihêje, min
xelas bike! bona xwe bisitirînim,
ji min re bibe zinarek, bona xela-
siya min, bibe kelehek xwurt!
3 Ji ber ku zinar û keleha min tu
yî, pêşengiyê bike, rê nîşanî min
bide, di oxra navê xwe de.
4 Min ji dafika ku bi dizîka avêti-
ne ber min, dûr bigire, ji ber ku
sitargeha min tu yî.
5 Ez ruhê xwe berdidim destên te,
ya XUDAN, Xwedayê dilsoz, te
ez xelas kirim!
6 Ez ji kesên ku xwe disipêrin
pûtên bêqîmet dikerihim, ez bi
XUDAN ewle dibim.
7 Ez ê di xêra te de kêfxweş bi-
bim û bicoşim; ji ber ku te rewşa
minî belengaz dît, tengasiyên ku
ez dikişînim, dizanî.
8 Û te min nexist destê neyaran,
cîhê ku ez pêlê dikim, te fireh kir.
9 Dilovaniyê li min bike, ya XU-
DAN! Ez di tengasiyê de me; ji
keserê canê min, çavê min û hun-
dirê min dikoje.
10 Temena min bi êş e, salên min
bi nalînê ve diçikin, ji ber sûcê
min, hêza min kêm dibe
û hestiyên min duhulin.
11 Ji ber neyarên xwe ez rezîl
bûm; bi taybetî jî ji neyarên xwe
re û ji nasên xwe re bûm tirsehê-
zekî; yên ku min li kuçê dibînin, ji
ber min direvin.
12 Mîna miriyek ji dil derketiye,
hatim ji bîr kirin: bûm mîna kû-
zek şikestî.
13 Ji ber ku ez tawanbariya gel-
lekan dibihîzim. Her alî di nava
tirsekî mezin de. li dijî min. dema

[1] Yanê çûl.

ku şîret li hev kirin, bona canê min
bistînin, dek û dolabê ava kirin.
14 Lê belê ez bi te ewledar im, ya
XUDAN, min got: Xwedayê min
tu yî!
15 Wextên min, di destê te de ne;
min ji lepê neyarên min û ji yê yên
ku li pêy min ketine, xelas bike!
16 Wecê xwe li ser qûlê xwe bibi-
riqîne; bi xêra xwe min xelas bike!
17 Min neşermîne, ya XUDAN! ji
ber ku min bangî te kir! Bila yên
xerab bişermin, di warê miriyan
de dengê wan qut bibe!
18 Bila ew lêvên derewîn hiş bin;
ew lêvên ku li hemberê mirovên
rast, bi quretî û li jor ve dinêrin û
bi çûkdîtinê diaxifin!
19 Qenciya te çiqas mezin e; tu
wêya bona yên ku ji te ditirsin
vedişêre, li ber çavên zarokên
mirov, qenciyê bi kesên ku xwe
sipartine te re kir.
20 Li dijî dek û desîseyên miro-
van, bi aramiya xwe yî parêzger,
bazikê xwe li ser wan vedikî; li
dijî zimanên êrîşker, tu wan di
çardaxa xwe de vedişêrî.
21 Bila pesnahî ji XUDAN re be!
Ji ber ku di bajarekî dora wê ha-
tiye girtin de, xêra xwe di şiklekî
nuwaze de xuyayî min kir.
22 Min di nava teşqelê de got:
Ez ji çavên te de hatim avêtin!
Lê belê dema te bangî alîkariyê
kirim, dîsa jî te li bergerîna min
bihîst.
23 Ji XUDAN hez bikin; ya
hemû qûlên wî yên dilsoz! XU-
DAN dilsozê xwe diparêze, lê ji
heqê yên xwe mezin dibînin jî bi
tûmî tê.
24 Ya hemû kesên hêviya xwe
bi XUDAN ve girêdane, xwurt û
bila dilê we bê metirsî bin!

**Zebûr 32**

1 Zebûra Dawid e. Maskîlek[1].
Xwezî li mirovê ku serîhildana wî
hatiye efû kirin, gunehên wî hati-
ne nuxumandin!
2 Xwezî ji mirovên ku XUDAN
xerabiyên wî nejimartiye û di
ruhê wî de hîle nîne!
3 Dema ku ez bê deng bûm, ji ber
nalîna min ya bitûniya rojê, hesti-
yên min heliyan.
4 Ji ber ku şev û roj, destê te li ser
min giran bû; dermanê min qedi-
ya mîna di germayiya havînê de
bû. (Sela.)
5 Min gunehê xwe ji te re daxuyanî
kir û sûcên xwe veneşartim.
Dema min got: Ez ê dijrabûnên[2]
xwe ji XUDAN re mukur bêm, te
gunehê sûcê min efû kir! (Sela.)
6 Bo vê sedemê her qûlê te yî
dilsoz, dema ku karibin bigihêjin

1 Maskîl: Mana wê bitûmî nayê zanîn, terimek edebî an jî mûsîkî ye, dibe ku di mana helbesta hînkirinê de be.
2 ...îsyanên xwe ji XUDAN re mukur bêm.

te, bila dua bikin; bi rastî avên ha-
rik di ser de here jî nikare bigihêje
wî.
7 Sitargeha min tu yî; tu min ji
tengasiyan diparêzî û dora min,
bi qesîdeyên xelasiyê ve tijî dikî.
(Sela.)
8 Ez ê te perwerde bikim û rêya
ku tu di wê de here, nîşanî te bi-
dim; ez ê şîretan bidim te, çavê
min li ser te ye.
9 Mîna hesp an jî qantiran fêhm-
kor nebin; bona îdare kirina wan
hewceyî hefsar û liwan dike, ya
na nêzîkî te nabin.
10 Êşa xeraban pirr e; lê belê yên
bi XUDAN ve bawer bin, dora
wan ji aliyê xêrê ve tê girtin.
11 Ya mirovên rast, bila bingeha
we yî kêfxweşiyê XUDAN be,
bicoş bin û hûn, ya hemû mirovên
dil paqij in; hûn hemû qêrînên
kêfxweşiyê bavêjin!

**Zebûr 33**

1 Ya mirovên rast, di XUDAN de
şa bibin! Pesnahiya wî, li mirovên
rast tê.
2 Bi lêxistina lîrê şikiryê ji XU-
DAN re bikin, bi çenkên deh
têlî, pesnahiya wî bi Zebûran ve
bidin!
3 Ji wî re murxek nû bixwînin: bi
qêrînên kêfxweşiyê sazên xwe bi-
din axaftin!
4 Ji ber ku gotina XUDAN rast e
û her karî bi dilsoziyê ve dike.
5 Ew ji rastî û dadiyê ve hez dike;
xêra XUDAN rûyê erdê dadigre.
6 Ezman bi gotina XUDAN û
afirên ezmanê jî bi hilma ku ji devê
wî derdikeve ve hate afirandin.
7 Ew avê behran berhev dike,
avên balûpal di embaran de dise-
kinîne[1].
8 Bila hemû rûyê erdê ji XUDAN
ve bitirse, hemû kesê ku li dinê
dijîn bila hurmetê ji wî re bikin!
9 Ji ber ku dema wî got, her tişt
çê bû û dema wî emir da, her tişt
eşkere bû.
10 XUDAN pîlanên netewan xera
dike, pêşniyarê gelan li valahiyê
derdixe.
11 Lê belê pîlanên XUDAN heta
bêdawîbûnê didome, pêşniyarên
di dilê wî de ji nifşeyê derbasî
nifşeyan dibe.
12 Xwezî li netewa ku Xwedayê
wan XUDAN e, ji gelê ku bona
xwe bijartiye!
13 XUDAN ji ezmanan ve di-
nihêre, hemû mirovan dibîne.
14 Ji cîhê ku rûniştiye, çavnêriyê
li hemû kesên ku li rûyê erdê dijîn
dike.
15 Yê ku dilê her kesî afirandiye,
her tiştên ku dike diwezîne, ew e.
16 Qiralê bi artêşên xwe yî çiqas
mezin serfiraziyê qezenc dike,
nîne; egît bi hêza xwe yî mezin
xelas nabe.

---
[1] Depo dike.

17 Hesp bona serfiraziyê hêviyek vala ye û bi hêza xwe yî mezin nikare kesekî xelas bike.
18 Lê belê çavên XUDAN, li ser kesên ku ji wî ditirsin, li ser yên ku hêviya xwe bi xêra wî ve girê dane ye.
19 Bi vî awayî wan ji mirinê ve xelas dike, bona di xelayê de bijîn alîkariyê ji wan re dike.
20 Canê me li benda XUDAN e; alîkarê me û mertalê me ew e.
21 Dilê me di wî de kêfxweş dibe, ji ber ku me hêvî bi navê wî yî pîroz ve anîne.
22 Mîna ku me hêviya xwe bi te ve girêdane, bila xêra te li ser me be, ya XUDAN!

**Zebûr 34**

1 Zebûra Dawid e. Dema li pêşiya Abîmelek xwe dîn xuya kir û ji aliyê wî ve hat qewirandin û çû. Ez ê her tim pesnahiyê pêşkêşî XUDAN bikim, dê pesnahiya wî ji zimanê min ve nekeve.
2 Canê min bi XUDAN ve pesnê xwe dide; bila yên belengaz[1] bibihîzin û kêfxweş bibin.
3 Tevî min, mezinahiya XUDAN bidin bihîstin û em navê wî pev re bilindtir bikin!
4 Ez li XUDAN geriyam û bersivê da min. Û min ji hemû tirsên min ve xelas kir.
5 Wan li wî nihêrtin û wecê wan ronî bû û wecê wan ji şermezariyê sor nebû.
6 Vî belengaza lava kir, XUDAN bihîst û wî ji hemû tengasiyên wî xelas kir.
7 Milyaketê XUDAN, li dora kesên ku ji wî ditirsin, artêşgehê ava dike û wan xelas dike.
8 Tahm bikin û bibînin, XUDAN çiqas qenc e! Xwezî li zilamê ku xwe sipartiye wî!
9 Ji XUDAN ve bitirsin, ya pîrozên wî! Ji ber ku, tu kêmasiya kesên ku ji wî ditirsin nabe.
10 Heta şêrên ciwan jî birçî û mo-taj dibin; lê belê tu qencî ji yên ku berê xwe dane XUDAN nayê veşartin.
11 Werin, ya zarokno, min guhdarî bikin: Ez tirsa XUDAN hînî we bikim.
12 Ma kî ye, ew mirovê ku ji jiyanê hez dike, ji bona ku qenciyê bibîne û dixwaze rojên qenc bibîne?
13 Bila zimanê xwe ji xerabiyê û lêvên xwe jî ji derewan biparêze.
14 Dev ji xerabiyan berde û qenciyê bike; bona aşitiyê bişuxule, li pêy aşitiyê bireve!
15 Çavên XUDAN, li ser mirovên rast e, guhê wî ji bo libergerînên wan vekiriye.
16 Wecê XUDAN, li dijî kesên xerab e, bîranînên wan ji rûyê erdê paqij dike û davêje.

1 Dilmelahîm, dilnizm.

17 Yên rast lava kirin û XUDAN
bihîst û wan ji hemû tengasiyên
wan azad kir.
18 XUDAN nêzîkî kesên dilşikes-
tiya ne û yên ku ruhê wan eciqîne
xelas dike.
19 Derdê kesê rast zêde ne, lê belê
XUDAN, wî ji hemûyan xelas dike.
20 Hemû hestiyên wî diparêze;
qet yek jî naşikê.
21 Dawiya mirovê xerab, bi xera-
biyê ve diqede û yê ji rastan dike-
rihin, cezên xwe dibînin.
22 XUDAN canê qûlên xwe xe-
las dike û tu kesê ku xwe sipartîne
wî, ceza nabînin.

**Zebûr 35**

1 Zebûra Dawid e. Ya XUDAN,
bi yên ku bi min re diştexilin re,
tu biştexile, tu, bi yên ku bi min re
şer dikin re, şer bike!
2 Mertala biçûk û ya mezin rahêje
û rabe[1] alîkariya min!
3 Li yên ku bera min didin, rim û
nîzeya xwe hilde, ji canê min re
bibêje: Ez ê te xelas bikim!
4 Yên ku qestî canê min kirine, bila
bişermin û rezîl bibin! Yê di der-
heqê min de xerabiyê difikirin, bila
bi şermezariyê ve şunda vegerin!
5 Bila mîna qirşikê kayê, yê di
ber bayê de bibin û bila Milyaketê
XUDAN bikeve pêş wan!
6 Bila rêyên wan tarî û şematokî
be û bila Milyaketê XUDAN wan
biteqizîne!
7 Ji ber ku bêsedem, torên bi dizî
ji min re ava kirin; bêsedem ji bo
canê min kortikê kolan.
8 Bila bêhay, asîw bê serê wî; ew
têkeve tora ku veşartiye û bi xwe
rastî asîwê bê!
9 Wê demê dê canê min di XU-
DAN de kêfxweşiyê bibîne û di
xelasiya wî de bicoşe.
10 Bi hemû hebûna xwe ez ê ûsa
bibêjim: Ma yekî mîna te heye,
ya XUDAN? Yekî belengaz ji
destê zordest, xizan û belenga-
zan ji destê şêlînker[2] ve xelas dike!
11 Şahdeyên nêtxerab peyde di-
bin; babetên ku ez nizanim, ji min
dipirsin.
12 Li dijî qenciyê xerabiyê ji min
re dikin; canê min tenê maye[3].
13 Lê belê dema ew nexweş dike-
tin, min cilikan li xwe dipêça, rojî
digirt û dilnizm dibûm. Gava dua
min bê bersiv dima,
14 Ez, mîna birayekî, hevalekî
winda kirime digeriyam. Mîna yekî
ku bona diya xwe şînê dikişîne, ji
keserê pişta min xwar dibû.
15 Lê belê gava ez tilpekî bûm,
civiyan û kêfxweş bûn, nemerdên
nas nakim, li hemberê min civiyan
û bêsekin, min ser û binî kirin.

1 Were, an jî: Bazde.
2 Rêbir, tazîkir.
3 Tune bûye, an jî: Sêwî maye.

16 Mîna qeşmerekî, Xwedê nenas,
diranên xwe li min qîriçandin.
17 Tuyê heta kengê temaşe bikî,
ya XUDAN? Canê min ji êrîşa
vana û jiyana min ji van şêrên ci-
wan xelas bike!
18 Ez ê di civata mezin de şikiriyan
pêşkêşî te bikim; di nava ajawê de
pêşkêşiyan ji te re rêz bikim.
19 Bila yên bi min re neyar in,
bêsebep kêfxweş nebin; yên ku
bêsedem ji min ve dikerihin, bila
çav ji hev re neşikînin!
20 Ji ber ku ew qala gotina aşitiyê
nakin; lê bi fenekî dek û dolaban
ava dikin ji mirovên aramiyên
welat re.
21 Li dijî min, devê wan bihostek
vekirî: Ox! Ox! dibêjin, a vay, me
bi çavên xwe ve dîtin!
22 Yê ku bû û qediya, te jî dît ya
XUDAN, bêdeng nemîne! Ya
Xudan, ji min ve dûr nesekine!
23 Hişyar be û rabe min biparêze,
bona mafê min biştexile, ya Xwe-
dayê min û Xudanê min!
24 Li gor dadiya xwe min bi heq
derxîne, ya XUDAN, Xwedayê
min! Û bila bi rewşa min ne-
kenin!
25 Bila di dilê xwe de nebêjin:
Ox! A vay, xwestina me ev bû!
Bila bi gotina: Me serê wî xwa-
rin! Li paş min neaxifin.
26 Yên bi halê minî xerab kêfxweş
dibin, bila bişermin û bila wecê
hemûyan sor bibe! Yê bi xirûr ve
li dijî min disekinin, bila têkevin
şermî û rezîltiyê!
27 Yên dixwazin ku ez bi heq der-
kevim, bila bi qêrînên kêfxweşiyê
ve bicoşin û her tim ûsa bibêjin:
Bila XUDANê ku ji dilxweşiya
qûlê xwe kêfxweş dibî, bilindtir
bibe!
28 Û wê demê dê zimanê min di
tûmiya rojê de dadiya te û pesna-
hiya te bibêje!

**Zebûr 36**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawidê qûlê XUDAN e. Serîhil-
dana mirovê xerab di binya dilê
min de dibêje: Tirsa Xwedê li ber
çavên wî de nîne.
2 Ji ber, xwe ûsa ecibandiye ku
sûcê xwe nabîne, ji wê nakerihe.
3 Ji devê wî xerabî û derew dihe-
rike, dev ji baqilbûnê û qencî ki-
rinê berda ye.
4 Heta di livînê xwe de jî fesadiyê
difikire, di rêya nebaş de inyadê
dike, xerabiyê red nake.
5 Ya XUDAN! Xêra te digihêje
ezmanan, dilsoziya te jî digihêje
rûyê ezman.
6 Dadiya te mîna çiyayên mezin
e, daraziyên te mîna balûpalên bê
serî û binî ne. Yê mirovan jî, hey-
wanan jî diparêze tu yî, ya XU-
DAN!
7 Xêra te çiqas bi qîmet e, ya
Xwedê! Zarokên mirovan xwe
disipêrin siya bazikên te!

8 Ji zêdeyiya mala te têr dibin, tu
ji çema zewqên xwe bi wan dide
vexwarin.
9 Ji ber ku çavkaniya jiyanê tu
yî, em di ronahiya te de roniyê
dibînin.
10 Xêra xwe, her tim xuyayî
yên te dinasin bike û rastiya xwe
nîşanî dilpaqijan bide!
11 Bila lingê xeraban neyê cem
min û destê xeraban min neqe-
wirînin!
12 Yên xerabiyê kirin, hema li wir
ketin; têk çûn, êdî nikarin rabin.

**Zebûr 37**

1 Zebûra Dawid e. Ji yên xerabiyê
dikin ve nekesire û hewesê li sûc-
daran meke!
2 Ji ber ku, ew ê mîna giya hema
biçilmisin û mîna gîhayek hêşîn
ziwa bibin û herin.
3 Tu bi XUDAN ve ewle bibe û
qenciyê bike; li welat ve rûnê û bi
dilsoziya wî xwe xwedî bike.
4 Ji XUDAN ve zewqê bigire; ew
jî xwestekên dilê te bide te.
5 Rêya xwe ji XUDAN re bihêle û
bi wî bawer bibe, dê ew ê jî bike!
6 Ew ê rastiya te mîna roniyê û
mafê te mîna tava nîvroyê derxe
ronahiyê.
7 Li pêşiya XUDAN bi aramî
hêvî bike û bi sebir bisekine!
Bi yên karên wan li cîh e û ji
bo mirovê ku fêlbaziyê dike,
nekesire!

8 Ji xeydê bireve, hêrsê berde!
Nekesire! Dê vêya te tenê ber bi
xerabiyê ve bajo.
9 Ji ber ku dê koka xeraban bê
kolandin; lê belê yên ku hêviya
xwe bi XUDAN ve girêdane, dê
welat bi mêrasî bigirin.
10 Dê di nêzîk de dawiya yê xe-
rab bê û tu li cîhê wî bigere jî, dê
neyê dîtin.
11 Lê belê dê yên dilnizm, welat
bi mêrasî bigirin û zewqa arami-
yek kûr tahm bikin.
12 Mirovê xerab, dek û dolaban
bona mirovê rast ava dike û di-
ranên xwe li dijî wî diqirçîne.
13 Lê belê Xudan bi yê xerab ve
dikene; ji ber, dizane ku dawiya
wî hatiye.
14 Yên xerab şûr kişandin û ke-
vanên xwe şidandin, bona ku la-
waz û belengazan têk bibe,
yên di rêya rast de ne bikujin.
15 Lê belê dê şûrên wan, di dilên
wan de biçike û kevanên wan
bişikê.
16 Hindikek hebûna yê rast, ji
gellek hebûna yê xerab çêtir e.
17 Ji ber ku dê hêza xeraban bê
şikandin; lê belê dê XUDAN bibe
alîkarê rastan.
18 XUDAN rojên kamilan diza-
ne û dê mêrasa wan jî heta bê-
dawîbûnê bidome.
19 Dê di roja xerab de neşermin
û di xelayê de zikê wan têr bibe.
20 Lê belê dê yên xerab rastî

têkçûnê bibin û neyarên XUDAN,
mîna çîçekên qirê hişk bibin û he-
rin, mîna dûyê belav bibin û herin.
21 Mirovê xerab bi deyn digire û
paşê nade; lê yê rast dilovaniyê
dike û dide.
22 Ji ber, mirovên ku wî wan
pîroz kiriye, dê welat bi mêrasî
bigirin û koka mirovên ku naletê
li wan aniye jî bê kolandin.
23 Ger ji rêya mirovan xoşnûd
bibe; XUDAN bi mirovan re ga-
vên rast dide avêtin.
24 Ger bikeve jî têk naçe mirov, ji
ber ku yê bi destê wî girtiye XU-
DAN e.
25 Ez ciwan bûm û kal jî bûm;
lê belê tu carî nedîtim ku mirovê
rast hatiye terikandin û nîjada wî
parsa nan dike.
26 Ew her roj merhamet dike
û deyn dide û nîjada wî tê pîroz
kirin.
27 Ji xerabiyê bireve û qenciyê
bike; tuyê bigihêje jiyana bê-
dawî!
28 Ji ber ku XUDAN ji rastiyê ve
hez dike û qûlên xwe yî dilsoz na-
terikîne. Dê ew heta bêdawîbûnê
bên parastin, lê dê koka xeraban
bê kolandin.
29 Dê yên rast, welat bi mêrasî
bigirin û li wir heta bêdawîbûnê
rûnin[1].
30 Devê yê rast zaniyarî dibêje û
ji zimanê wî dadî dilop dibe.
31 Zagona Xwedê di dilê wî de
ye; lingê wî naşemite.
32 Yê xerab, kemînê davêje ber yê
rast û bona kuştina wî dişuxule.
33 Lê belê XUDAN wî naxe des-
tê yê xerab û dema darazkirinê wî
mehkûm nake.
34 Hêviyê bi XUDAN ve girê
bide, rêya wî bigire û bona ku tu
welat bimêrasî bigire, dê te bi-
lindtir bike; tuyê bibîne ku dema
reha xeraban tê kolandin.
35 Min zilamê xerab û bêînsaf dît,
mîna darê ku di axa cara yekemîn
de hatiye çikandin û hêşîn bûye,
gulî û qîtikan ber dida.
36 Lê ew derbas bû û çû, tune bû
û min lê lêkolînê kir[2], lê nehat
dîtin.
37 Çavnêriyê li zilamê çalak bike
û li zilamê rast binêre; ji ber ku
sibehan[3] yê aştîperwera ye.
38 Lê belê hemû kesên serîhilda-
ne, dê tune bibin, koka xeraban bê
kolandin.
39 Lê belê xelasiya rastan ji XU-
DAN ve tê; di roja teng de ji wan
re dibe keleh.
40 Û XUDAN alikariyê bi wan
re dike û wan xelas dike; wan ji
destê xeraban digire û azad dike,
ji ber ku xwe disipêrin wî.

1 Biminin, bijîn.
2 Ez geriyam wê.
3 Dahatû, pêşhatî, dawî.

**Zebûr 38**
1 Zebûra Dawid ya bona bîranînê
ye. Ya XUDAN, bi xezeba xwe
min neazirîne û bi hêrsa xwe min
neyne ser rê!
2 Ji ber ku tîrên te di hundirê
min ve çûn û destê te daket ser
min.
3 Ji ber hêrsa te, tenduristiya min
xera bû; ji ber gunehê min aşîtiya
min winda bû.
4 Ji ber ku sûcên min ji serê min
derbas bûn, mîna barekî nayê
kişandin di pişta min de giran
bûn.
5 Ji ber bêaqiliya min, birînên min
erjeng û bi nêm in.
6 Ez xwar bûm û pirr qat bûm;
di hemûya rojê de bi şînê ve di-
gerim.
7 Ji ber ku pişta min di nava agir
de û di bedena min de tenduristî
nîne.
8 Heta ku tu bibêje hatim perçi-
qîn, ji ber êşa dilê xwe dinalim.
9 Ya Xudan, tu hemû bêrîkirinên
min dizane û nalînên min ji te ve
ne veşartî ne.
10 Dilê min li hev dikeve, hêza
min diçike û heta ronahiya çavê
min jî tefiya.
11 Heval û hogirên min, ji ber
derdê min direvin û merivên min
ji min dûr disekinin.
12 Û yên li canê min digerin jî,
dafikê davên pêşiya min; yên
zirara min dixwazin, gotinên xe-
rab dibêjin û di hemûya rojê de
hîleyan difikirin.
13 Lê belê ez mîna kerrekî na-
bihîzim û mîna lalekî devê xwe
venakim.
14 Belê, ez bûme mîna zilamek
ku nabihîze û di devê wî de bersiv
nîne.
15 Ji ber ku hêviya min di te de ye,
ya XUDAN; tuyê bersivê bide, ya
Xudan, Xwedayê min!
16 Ji ber ku gotim: Bila bi halê
min kêfxweş nebin; dema lingê
min bişemite, bila li dijî min qure-
tiyê nekin!
17 Ji ber ku ez li ber ketinê me û
êşa min her tim li ber min e.
18 Ji ber ku ez sûcê xwe eşkere
dikim, ji bo gunehên xwe dike-
vim xemê.
19 Lê belê neyarên min xwurt û
bi zindî ne û yên ku bêsedem ji
min nefret dikin, pirr in.
20 Û yê li berdêla qenciyê xerabi-
yê dikin, li dijî min derdikevin, ji
ber ku ez li pêy qenciyê diçim.
21 Min neterikîne, ya XUDAN!
Ya XUDANê min, ji min ve dûr
nesekine!
22 Bona alîkariya min baz bide,
ya Xudan, Xelasiya min!

**Zebûr 39**

1 Bona serekê mûsîkê Yedûtun.
Zebûra Dawid e. Min got: Ez ê
bala xwe bidim gavên xwe, zi-
manê xwe ji gunehan ve biparê-

zim; heta ku yekî xerab li hembe-
ra min bisekine, ez ê gemê li devê
xwe bixim.
2 Zimanê xwe girtim û hiş bûm,
ji bo qenciyê jî bêdeng bûm û êşa
min zêde bû.
3 Dilê min ji hundirê min ve pê-
ket; agir girt, dema ez hûr û kûr
difikiriyam, ev gotinan ji zimanê
min ve weşiyan: 4 Bigihîne min,
ya XUDAN, dawiya min û rojên
minî jimartî; ez zanibim, ka te-
menê min çiqas kurt e!
5 A vay, te rojên min kirin bihos-
tek û jiyana min mîna tune ye li
ber te; her mirov, tenê hilmek e,
di dema xwe yî herî qenc de jî!
(Sela.)
6 Bi rastî mirov mîna siyekê di-
gere; belê, bêsedem bêaram dibe;
malan dicivîne, lê belê nizane ku
ji kê re bimîne.
7 Û niha ya Xudan, ez li benda çi
bim? Hêviya min di te de ye!
8 Min ji hemû serîhildanên min ve
xelas bike; destûrê nede ku bila mi-
rovên bêhiş heqaretê li min bikin!
9 Ez hiş bûm, devê xwe venakim;
ji ber ku yê vêya kiriye tu yî!
10 Kulmikên xwe ji ser min ve
dûr bibe; ez di bin şîrmaqa te de
mehf bûm.
11 Tu bi mirov re ji ber sûcê wî,
dipeke û wî tîne rê. Mîna bizûzê,
tiştên ku ew ji wê hez bike diçi-
kînî; belê, her mirov tenê hilmek
e. (Sela.)
12 Dua min bibihîze, ya XUDAN!
û guh bide li bergerîna min. Li ber
hêstirên çavên min, bêtêkilî nese-
kine! ji ber ku ez xerîbek im li
cem te. Mîna hemû kalikên xwe
mêvanek im.
13 Nêrînên xwe, ji ser min ve dûr
bibe! Berî ku ez koç bikim û tune
bim, dilxweş bibim!

**Zebûr 40**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ez bi sebir, li benda
XUDAN mam û wî berê xwe da
min û li bergerînê min bihîst.
2 Wî min ji kortala mirinê û ji
nava heriyê derxist û lingên min
li ser zinar ve sekinandin û gavên
min zeximandin.
3 Û murxek nû xist devê min, bona
Xwedayê me qesîdeyek pesnahi-
yê, dê gellek kes bibînin û bitirsin
û bi XUDAN ve ewle bibin.
4 Xwezî li wî mirovî ku ewlehiya
wî XUDAN e û rû nade kesê bi
kubr û yên ku bi derewan ve çewt
bûyîne!
5 Ya XUDAN, Xwedayê min;
bona me nuwazeyên te, ramanên
te çiqas zêde ne, kes nikare ji te
re şirîkan çêke! Ger bixwazim ku
wana bidim bihîstin, bi jimartinê
ve nayê qedandin.
6 Tu bi qurban û pêşkêşiyan ve
şa nabî; te ne boraqa şewitandinê
xwest, ne jî pêşkêşiya gunehî,
lê belê te guhên min vekir.

7 Wê çaxê gotim: A vay, ez têm;
di tomara pirtûkê de di derheqê
min de hatiye nivîsandin;
8 Ya Xwedayê min, ji kirina xwestina
te, ez zewqê digirim û Zagona te di
kûraniya dilê min de ye!
9 Di civaka mezin de, rastiya te
mizgînî dam; lêvên xwe nadim
hev, ya XUDAN, tu dizanî!
10 Rastiya te di hundirê dilê xwe
de veneşartim; dilsozî û xelaskeri-
ya te dam bihîstin, xêr û dilsoziya
te ji civaka mezin ve veneşartim!
11 Ya XUDAN, dilovaniyên xwe
ji min ve neparêze! Bila dilovanî û
dilsoziya te her tim min biparêzin!
12 Ji ber, belayên ku bê hejmar
dora min girtine; sûcên min nêzîkî
min bûn, ez pêşiya xwe nabînim;
ji porên li serê min in jî zêdetir in
û dilê min ez berdam.
13 Çi dibe, ya XUDAN, min xe-
las bike! Baz de alîkariya min, ya
XUDAN!
14 Bila yên ku dixwazin canê min
bistînin, hemû bi hev re bişermin;
bila wecê wan sor bibe; bila şûn
de vegerin yên ku zirara min dix-
wazin û rezîl bibin!
15 Yên ku dibêjin: Ox! Ox! Bila li
nav şermezariya xwe de xwe şaş
bikin.
16 Bila di te de kêfxweşî û şahiyê
bibînin, hemûyên ku berê xwe
dane te! Her tim: XUDAN bilind
e! bibêjin, yên ku ji xelaskirina te
hez dikin!
17 Lê ez jî xizan û belengaz im,
ya Xudan, min bifikire. Alîkar û
xelaskerê min tu yî, dereng nemî-
ne, ya Xwedayê min!

**Zebûr 41**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Xwezî li yê ku xizanan
difikire! XUDAN di roja xerab de
wî xelas dike.
2 XUDAN wî diparêze û jiyanê
dide wî; ew li ser rûyê erdê ve
kêfxweş dimîne û wî nade destê
neyaran û naterikîne.
3 XUDAN ji wî re dibe alîkar,
dema bikeve nava livîna; dema
nexweş bikeve, wî digehîne ten-
duristiyê.
4 Bila heyfa te li min bê, ya XU-
DAN! Gotim: Şîfê bide min, ji
ber ku li dijî te guneh kirim!
5 Neyarên min ji bo min, bi xera-
bî diaxifin: Ka dê kengê bimire
û yê ku bila navê wî ji navendê
rabe? dibêjin.
6 Dema kesek bona dîtina min
were, derewan dibêje, di dilê xwe
de fesadiyê dicivîne; pişt re der-
dikeve derve û fesadiyan belav
dike.
7 Hemû kesên ji min dikerihin,
her tim di nava hev de, li dijî min
kust û pistê dikin; li dijî min xe-
rabiyê difikirin: 8 Tiştekî ewqas
xerab hate serê wî ku, dibêjin
û: Êdî nikare ji nava livîna xwe
rabe!

9 Hevalê min ê ku min nanê xwe
pê re par kiribû; yê bi wî re ewle
bûbûm jî îxanetê ji min re kir.
10 Lê bila heyfa te li min bê, ya
XUDAN, min rake û ez ê ji heqê
vana bêm der!
11 Ger neyarê min qêrînên serfira-
ziyê nebêje, ez ê wê demê fêhm
bikim ku tu ji min xoşnûd î.
12 Lê ji ber serrastiya min, ji min
re dibî alîkar, heta bêdawîbûnê,
min di hizûra xwe de digirî.
13 Ji bêberiyê, heta bêdawîbûnê,
bila pesnahî ji Xwedayê Îsraêlê
XUDAN re be!
Amîn, belê, Amîn!

PIRTÛKA DUWEMÎN (2)

**Zebûr 42**

1 Bona serekê mûsîkê. Maskîla
lawên Korah e. Xezal çawa bêri-
ya avên diherikin bike, canê min
jî ûsa bêriya te dike, ya Xweda!
2 Canê min ji Xwedê re, ji Xwe-
dayê zindî re tî bûye: Ka ez ê
kengê bona dîtina wecê Xwedê
herim?
3 Hêsirê çavê min, bi şev û rojê
bûn xwarina min; ji ber ku di
hemûya rojê de ji min re dibêjin:
Ka Xwedayê te li ku ye?
4 Dema vana di bîra xwe de tî-
nim; di hundirê min de canê
min duhule; ez çawa bi civakê
re dimeşiyam, heta mala Xwedê
çawa pêşengiyê ji civakê re diki-
rim û di nava dengên kêfxweşî û
şikiriyê de, bi ajaweyek cejnê di-
kirin re.
5 Tu çima bi keser î, ya canê min
û çima di hundirê min de bêaram
î? Hêviya xwe bi Xwedê ve girê
bide! Ji ber ku ez ê dîsa pesnahi-
yan pêşkêşî wî bikim; ji bo xelas-
kirina rûyê wî.
6 Dilê min bi xem e, bo vêya ez te
di bîr tînim, ya Xwedayê min. Li
herêma Urdunê, di çiyayên Her-
mon û Mîsarê de,
7 Dema rêjgehên te deng bide,
balûpal bangî hev û din dikin;
hemû şepêlên te, şêlavên te, di ser
min de derbas bûn.
8 Bi roj XUDAN dilovaniya xwe
dide xuya kirin û bi şevê Zebûran
dibêjim, dua dikim; ji Xwedayê
jiyana xwe re.
9 Ez ji Xwedayê xwe yî Zinarê
min e re dibêjim: Te çima min ji
bîr kir? Ez çima di bin zora ne-
yarên xwe de bi şîn bigerim?
10 Di hemûya rojê de her ku ne-
yarên min, bi gotina: Kanê Xwe-
dayê te? Bela xwe di min didin,
ûsa dibe ku, mîna hestiyên min
bên şikestin.
11 Tu çima bi xem e, ya canê
min, çima tu di hundirê min de
dinalî? Hêviya xwe bi Xwedê
ve girê bide! Ji ber ku ez ê dîsa
pesnahiyan pêşkêşî wî bikim; ew
xelasiya rûyê min û Xwedayê
min e.

**Zebûr 43**

1 Li mafê min bigere, ya Xwedê!
Li dijî netewa bêwefa min biparê-
ze, ji mirovê fenek û neheq min
xelas bike!
2 Ji ber ku tu Xwedayê min, ke-
leha min î; te çima min red kir?
Çima ez di bin zora neyarên xwe
de, bi şîn bigerim?
3 Ronahiya xwe û rastiya xwe
bişîne, bila ew rê ji min re xuyanî
bikin; bila min bibin çiyayê te yî
pîroz û mala te.
4 Wê çaxê ez ê herim pêşkêşgeha
Xwedê; herim Xwedayê ku
çavkaniya kêfxweşî û dilxweşiya
min e û ji te re, ya Xwedê, Xwe-
dayê min; bi lîrê ve şikiryê
bikim!
5 Tu çima bi xem e, ya dilê min?
Û çima di hundirê min de dinalî?
Hêviyê bi Xwedê ve girê bide!
Ji ber ku ez ê dîsa pesnahiyan
pêşkêşî wî bikim. Rizgariya rûyê
min û Xwedayê min ew e.

**Zebûr 44**

1 Bona serekê mûsîkê. Maskîla
lawên Korah e. Ya Xwedê, me
bi guhên xwe ve bihîstin, kalikên
me ji me re gotin; di rojên wan de,
di rojên kevin de ew karên mezin
ku te kirine.
2 Te bi destê xwe ve gelan ajotin;
lê belê te wan bi cîh kirin; te ne-
teweyan şikandin; lê belê te wan
ragihandin.
3 Ji ber wan welat, bi şûrê xwe ve
qezenc nekirin û bi baskên xwe
xelas nebûn; vêya bi saya destê te
yê rast, bazinda te û bi şewla wecê
te bû; ji ber ku te ji wan hez kir.
4 Ya Xwedê, qiralê min tu yî, emir
bide ku, bila Aqûp xelas bibe!
5 Em'ê bi saya te, neyarên xwe
belav bikin; bi navê te neyarên
xwe biperçiqînin.
6 Ji ber ku ez bi kevana xwe ne
ewle me û şûrê min jî min xelas
nake.
7 Lê tu yî, yê ku me ji neyarên me
ve xelas dike, yê ku ji me dikeri-
he, bi şermezariyê ve dixeniqîne.
8 Em temamiya rojê, bi Xwedê
ve pesnahiyê didin û heta bê-
dawîbûnê şikiryê pêşkêşî navê te
dikin. (Sela.)
9 Çi heye ku, te me red kir, me
biçûk dît û bi artêşên me re der-
nakevî.
10 Te li ber neyar me bi paş ve
xist û yên ji me dikerihin, me tazî
kirin.
11 Te me kir mîna pezê qesabî û
di nava netewan de em belav ki-
rin.
12 Bêqîmet te qûlên xwe firot û
di ser de, ji firotinê ve te tu tiştî
qezenc nekir.
13 Te me ji cîranên me re kir
rûreş, ji yên li dora me ne re kir
qerfokek û tiştek pêkenok.
14 Te me xist zimanê neyaran, ne-
tewe bi halê me ve dikenin.

15 Rezîltiya min di temamiya rojê
de li hemberê min û ji şermezariya
xwe, ez ketim bin erdê.
16 Ji ber ku ewqas heqaret û ku-
firyê bihîstim, li hemberê dijminê
ku dixwaze tolê bistîne.
17 Vana hemû hatin serê me, lê
dîsa jî me te ji bîr nekirin û îxa-
netê li peymana te nekirin.
18 Dilê me paş ve venegeriya û
şopên me ji rêyên te şaş nebûn.
19 Lê belê te me perçiqandin,
welatê me kir rêgeha çeqelan û
tariya mirinê bi ser me ve girt.
20 Ger me navê Xwedayê xwe ji
bîr bikirana û me destên xwe ji
îlahekî biyan re vekirana,
21 Dê Xwedê vêya eşkere ne-
kira? Ji ber ku ew razê di dil de
dizane.
22 Belê, em di oxra te de her roj
tên kuştin, mîna pezên qesabî tên
hesibandin.
23 Hişyar be, ya Xudan! Tu çima
radizê? Rabe! Heta bêdawîbûnê
me neterikîne!
24 Tu çima wecê xwe vedişêrî?
Çima zordestiya li ser me û halê
me yî belengaz ji bîr dikî?
25 Ji ber ku canê me heta axê xwar
bû, bedena me bi axê ve zeliqî.
26 Rabe, alîkariyê bi me re bike!
Di oxra xêra xwe de me xelas
bike!

**Zebûr 45**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma Sosinê de, Maskîla lawên Ko-
rah e. Qesîda Evînê.
Dilê min bi gotinên xweş dicoşe;
ez helbestên xwe, bona qiral
dibêjim! Bila zimanê min, mîna
pênûsa nivîskarekî hosta be!
2 Tu ji lawên mirovan hîn
xweşiktir î, xêr weşiyaye li ser
lêvên te. Ji ber vê yekê, Xwedê
heta bêdawîbûnê te pîroz kiriye.
3 Ya şervanê egît, şûrê xwe, rew-
naqî û hêrsa xwe bi pişta xwe ve
girê bide!
4 Û di oxra dadî û rastiyê[1] de, bila
destên te yî rast, karên bi tirsehêzê
xuyayî te bide.
5 Tîrên te tûj in, qiral bi dilên ne-
yarên te ve diçike, bila netewe li
bin lingên te de bên raxistin.
6 Ya Xwedê, textê te heta bê-
dawîbûnê bidome[2], çoyê qiral,
çoyê dadiyê ye.
7 Tu ji rastiyê hez dikî û ji xera-
biyê ve dikerihî; bo vê Xwedê,
Xwedayê te, te ji hemdemên te
zêdetir, bi rûnê kêfxweşiyê ve
mesh kir.
8 Ji hemû kincên te bêhna mur,
talîjar û darçînê tê; dema dengê
sazên ji qesrên ji diranê fîlan ve
hatine ava kirin tê te, tu bi wê kêf
dikî!

1 An jî: Di oxra rastî, dilnizmî û dadiyê de.
2 An jî: Qiraletiya ku Xwedê bi xelatî daye te, dê heta bêdawîbûnê bidome.

9 Keçikên qiralan, di nava pîrekên
te yî birêz de ne; qiralîçe di nava
zêrên Ofîrê de, li aliyê te yî rastê
ve sekiniye.
10 Guhdar bike ya keçik, binêre,
guh bide; gelê xwe û mala bavê
xwe jî, ji bîr bike!
11 Û qiral li xweşikya te bixwaze,
ji ber ku ew efendiyê te ye, li ber
wî xwar bibe!
12 Û keça Sûrê dê xelatan bîne,
dê dewlemendên gel, bixwazin ku
xêra te qezenc bikin.
13 Qîza qiral, di hundur de dibi-
riqe, şewle dide; kincê wê bi zêr
ve hatiye çêkirin.
14 Dê di nava kincên bixemil de
derkeve ber qiral, dê hevalên wê,
keçên bi wê re tên, ji te re bînin.
15 Dê bi kêfxweşî û coşiyê ve bi-
bin, dê têkevin qesra qiral.
16 Dê law, di cîhê bavê te de bi-
bin lawên te; tuyê wan ji hemûya
welat re bikî serok.
17 Ez ê navê te, di nava hemû
nifşeyan de bijînim, bi vî awayî,
dê hemû gelan, heta bêdawîbûnê
pesnê te bidin.

**Zebûr 46**

1 Bona serekê mûsîkê. Bona
Alamot. Murxek lawên Korah e.
Xwedê hêz û sitargeha me ye, di
tengasiyê de, tim bona alîkariyê
amade ye.
2 Bo vê yekê, rûyê erdê bi ser û
binî bibe jî, em natirsin, ger çiya
bi sînga behran bikevin jî.
3 Av bi qêrîn û bi kêf bibin,
şepêlên behra rabûyî, çiyayan bi-
lerizîne jî. (Sela.)
4 Çemek heye ku, avên wê ji ba-
jarê Xwedê re kêfxweşiyê tîne, ji
mala Bilindê Bilindan re.
5 Xwedê di nava wê de ye, ew
bajar nalerize; dema roj dihilê,
Xwedê alîkariyê bi wî re dike.
6 Netew diqûrin, qiralî dilerizin;
dema ew digurme, rûyê erdê di-
hule û diçe.
7 XUDANê serwerê hemû hêzan,
bi me re ye, Xwedayê Aqûp ke-
leha me ya bilind e. (Sela.)
8 Werin û kirinên XUDAN, yên
mezin bibînin, xerakirinên ku ani-
ye rûyê erdê!
9 Li çar hawirdorê rûyê erdê şeran
disekinîne, kevanan dişikîne û
riman perçe dike û mertalan[1]
dişewitîne.
10 Bi aram bin û bizanibin ku,
Xwedê ez im! Ez ê di nava nete-
wan de bilind bibim, di rûyê erdê
de bilind bibim!
11 XUDANê Serwerê hemû hêzan
bi me re ye, Xwedayê Aqûp, ke-
leha me ya bilind e! (Sela.)

**Zebûr 47**

1 Bona serekê mûsîkê. Murxek
lawên Korah e. Ya hemû nete-
weyan, dest li hev bixin! Ji rûme-

[1] Mertalan, an jî: Erebeyên şer.

ta Xwedê re qêrînên kêfxweşiyê
bavêjin!
2 Ji ber ku XUDANê mezin, bi
tirsehêz e; qiralê bilind yê hemû
gerdûnê ye.
3 Gelan di bin me de, netewan di
bin lingên me de radixe.
4 Mêrasa me, ya ku xurûra Aqûpê
ku ew ji wî hez dike, wî bona me
bijart. (Sela.)
5 Xwedê di nava qêrînên
kêfxweşiyê de, XUDAN di nava
dengê boriyan de bilind bû.
6 Zebûran pêşkêşî Xwedê bikin,
Zebûran pêşkêş bikin; Zebûran
pêşkêşî Qiralê me bikin, Zebûran
pêşkêş bikin!
7 Ji ber ku Xwedê Qiralê hemûya
dinê ye; murxan bi ferasetê pêşkêş
bikin!
8 Xwedê di texta xwe yî pîroz de
rûnişti ye, Xwedê Qiraletiyê ji ne-
tewan re dike.
9 Serokên neteweyan, bi gelê
Xwedayê Birahîm re hatine cem
hev; ji ber ku mertalên[1] rûyê
erdê, aidî Xwedê ne; ew pirr bi-
lind e.

**Zebûr 48**

1 Qesîde. Zebûrek lawên Korah
e. XUDAN mezin e û pirr liyaqî
pesnahiyê ye û li bajarê Xwedayê
me, li çiyayê wî yî pîroz.
2 Kêfxweşiya hemûya rûyê erdê
Çiyayê Siyonê, bi alûsiyê ve bi-
lind dibe, aliyê başûr[2] ve, bajarê
Qiralê bilind.
3 Xwedê di qesrên wî de, bi qû-
leyekî zexm xwe da xuyakirin.
4 Ji ber ku a vay, qiralan civiyan û
pev re meşiyan.
5 Lê belê gava wî dîtin, şaş û
metal man; ketin tirsehêzê û re-
viyan.
6 Mîna pîreka bi jana welidan-
dinê ve dikeve, lerizînek bi wan
ve ket.
7 Tu bi bayê şerqê keştiyên Tarşîşê
dişêkîne.
8 Di bajarê XUDANê artêşan
de, di bajarê Xwedayê me de,
me çawa bihîstibûn, ûsa dîtin.
Dê Xwedê wî heta bêdawîbûnê
di nava ewledariyê de bihêle.
(Sela.)
9 Ya Xwedê, em di perestgeha
te de difikirin ku, tu çiqas bi
wefa ye.
10 Mîna navê te, ya Xweda, pes-
nahiya te jî, digihêje çar hawir-
dorê dinê. Destê te yî rastê, bi
dadiyê ve tijî ye.
11 Bila Çiyayê Siyonê kêfxweş
be, bila bicoşin keçên Cihûda, bi
daraziyên te!
12 Li dora Siyonê bigerin û bizî-
virin, qûleyên wê bijmêrin.

1 Yanê qiralên rûyê erdê.
2 Şaxa Safon: Ûsa tê fikirin ku Îlahî Baal li vî çiyayî rûdine.

13 Bi balkêşî li bircên wê
binihêrin, kelehên wê temaşe
bikin ku, hûn ji nifşeya bê re
bibêjin!
14 Ji ber ku ev Xwedê, her tim û
abadîn Xwedayê me ye! Dê ew ê
heta mirinê rê nîşanî me bide!

## Zebûr 49

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûrek
lawên Korah e. Ya hemû gelno;
vêya guhdarî bikin; ya hemûyên
di dinê de dijîn, guh bidin;
2 Lawên gel, lawên began, hemû
dewlemend û Xizanno!
3 Dê zaniyarî ji devê min ve
biweşe û ramanê dilê min dê bibe
fêhmkarî.
4 Ez ê guh bidim methelokan, ez
ê mamika xwe bi lîrê ve bînim zi-
man.
5 Çima ez di rojên xerab de bitir-
sim, dema neyarên minî nêt xerab
dora min bigirin?
6 Ew bi hebûnên xwe ve ewledar
in, bi serwetên xwe yî mezin ve
pesnê xwe didin.
7 Kes nikare berdêla jiyana birayê
xwe bide, ew nikare fîdyê bide
Xwedê.
8 Ji ber ku jiyana mirovan pirr gi-
ranbuha ye û divê bêdawî dev ji
vêya berde!
9 Ger ne ûsa be, mirov heta bê-
dawîbûnê dijî, wecê qebran nabîne.
10 Ji ber ew dibîne ku zaniyar
dimirin. Bêwac û ehmeq tune di-
bin û malên xwe ji kesekî din re
dihêlin.
11 Fikrê hundirê wan ev e: Malên
wan heta bêdawîbûnê bimîne û
xaniyê wan[1]; ji nifşeyan, derbasî
nifşeyan bibin, navên xwe didin
erdê xwe jî.
12 Li ber hemû rewnaqiya xwe,
mirov derbas dibin, mîna hey-
wanên dimirin û diçin.
13 Rêya ehmeqan ev e; yên ku li
pêy wan tên, ji gotinên wan zew-
qê digirin. (Sela.)
14 Dê mîna keriyan ber bi warê
miriyan ve bên ajotin; dê mirin
wan biçêrîne û dema berbang ba-
vêje, dê yên rast li ser wan ve ser-
wer bibin û ji dûrî xaniyên wan,
dê warê miriyan cesedê wan biri-
zîne[2].
15 Lê belê dê Xwedê canê min, ji
lepên warê miriyan xelas bike û
bigire cem xwe. (Sela.)
16 Dema mirovek dewlemend
bibe, rewnaqiya mala wî zêde
bibe, metirse.
17 Ji ber ku dema ew bimre, nika-
re tiştekî bi xwe re bibe; rewnaqi-
ya wî, bi wî re naçe qebrê.

---

1 Bi Targûmi, Septûaginta û Suryaniti dê qebrên wan heta bêdawîbûnê bibe malên wan. bi Îbraniti bi ramanê dê malên me heta bêdawîbûnê bimîne difikirin.

2 Warê miriyan ji wan re bibe xanî. an jî: Wan xera bike.

18 Ger dema di jiyanê de xwe
kêfxweş bihesibîne jî û dema ser-
firaz be, pesnahiyan bicivîne jî;
19 Dê beşdarî nifşeya kalikên
xwe bibe, ew ku, êdî tu carî rona-
hiyê nabînin.
20 Li dijî hemû rewnaqiya xwe,
dîsa jî mirov fêhmkor e, mîna
heywanên dimire û diçe ye!

**Zebûr 50**

1 Zebûra Asaf e. Xwedayê bihêz,
XUDAN dibêje û ji cîhê ku roj di-
hilê, heta cîhê ku diçe ava, bangî
hemûya rûyê erdê dike.
2 Ji Siyona şaxa xweşikyê ye, di-
biriqe Xwedê.
3 Bê deng namîne; Xwedayê me
tê, agirê ku li ber wî dişewite, her
tiştî dike xwelî, bahozek bi hêz ji
dora wî tê.
4 Bona ku gelê xwe daraz bike,
ezman û erdê dike.
5 Qûlên min ên dilsoz li ber min
bicivînin, yên ku bi jêkirina qur-
banê peymanê bi min re çêkiri-
ne!
6 Û ezman, rastiya wî têdighîne,
ji ber ku Xwedê bi xwe dadger e.
(Sela.)
7 Ya gelê min, guhdarî bike ku ez
biaxifim; ya Îsraêl, li hemberî te
şahdeyiyê bikim! Ez Xwedê me,
Xwedayê te me!
8 Ji ber qurbanên te; ez bi te nape-
kim û qurbanên te yî şewitandinê,
tim li ber min in.
9 Ez ê ne ji mala te gayek, ne jî ji
kozên te nêriyek bistînim.
10 Ji ber ku hemû afirên daristanê,
hemû heywanên li ser hezar çiyan
yên min in.
11 Ez hemû civîkên li çiyê ne, nas
dikim û hemû heywanên bejî ên li
qirê jî yên min in.
12 Ez birçî bibûma, ji te re ne-
digotim, ji ber ku hemû dinya û
tiştên tê de ne, yên min in.
13 Ma ez goştê gayan dixwim?
An jî, xwîna bizinan vedixwim?
14 Qurbana şikiryê pêşkêşî Xwe-
dê bike û qewlên ku te bona Bilin-
dê Bilindan daye, bîne cîh!
15 Û di roja xwe yî teng de, bangî
min bike; ez ê te xelas bikim û
tuyê jî min bilindtir bike!
16 Lê belê Xwedê ji mirovê neçê
re ûsa dibêje: Çi heqê te heye ku, tu
qaîdeyên min ji ezber dixwînî, an
jî, peymana min digirî devê xwe?
17 Ji ber ku, tu ji anîna ser rê ve
dikeribe û gotinên min davêjî
paşiya xwe.
18 Dema tu dizekî bibînî, tu bi wî re
dibî heval û dibî şirîkê zinêkiran.
19 Devê xwe bona xerabiyê
duşuxulînî, zimanê xwe ber bi de-
rewan ve ber didî.
20 Tu rûdinî, li dijî birayê xwe diaxi-
fî; îftira davêjî lawê dayika xwe.
21 Te vana kir, ez bê deng mam;
te min jî wekî xwe dît. Lê belê ez
te diazirînim û sûcên te datînim
ber çavên te.

22 Ya kesên ku Xwedê ji bîr kiri-
ne, vêya bidin ber çavan! Ya na ez
ê we perçe bikim, dê xelaskerê we
jî tune be!
23 Her kî, ku qurbana şikiryê
pêşkêş bike, dê min bilind bike;
ez ê xelasiya Xwedê nîşanî kesên
ku rêya xwe rast kirine bidim!

**Zebûr 51**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Paşî Dawid bi Bat-
Şebayê ve raket, dema pey-
xamber Natan hate cem wî. Ya
Xwedê, li gor xêra xwe ji min
re kerem bike; li gor mezinahiya
dilovaniya xwe, serîhildanên min
paqij bike!
2 Min bi tûmî ji sûcê min ve bişo û
min ji gunehên min ve pak bike!
3 Ji ber ku ez bi serîhildanên xwe
dizanim û gunehên min, her tim li
ber min in.
4 Min li dijî te, tenê li dijî te gu-
neh kir û tiştê ku di çavê te de
xerab e kir, ûsa ku, dema axaftinê
tu bi heq, dema darazkirinê jî bi
dadî be.
5 Çawa ku ez di nava sûcan de
hatime dinê û diya min di nava
gunehan de, bi min re ducanî bû.
6 Madem ku tu ji dil dilsoziyê
dixwaze û di kûraniya dilê min
de, zaniyariyê nîşanî min bide.
7 Min bi gîhayê kewan[1] ve paqij
bike, ez pak bibim, min bişo, ez ji
berfê ve spîtir bibim!
8 Dengê dilxweşî û kêfxweşiyê
bigehîne min, bila hestiyên ku te
perçiqandiye cejnê bikin.
9 Li gunehên min nenihêre û
hemû sûcên min paqij bike!
10 Ya Xwedê, di min de dilek
paqij biafirîne û ji nû ve ruhek
bi qirar di hundurê min de ava
bike!
11 Min ji hizûra xwe ve nevêje û
Ruhê xwe yî pîroz ji min nestî-
ne!
12 Kêfxweşiya xelasiyê ya ku te
dabû min, şunda vegerîne û bi
ruhekî xwestekar, ji min re bibe
alîkar!
13 Ez rêya te hînî merivên serî hil-
dane bikim û dê gunehkar şunda
vegerin te.
14 Min ji sûcê xwîn rijandinê
xelas bike; ya Xwedê, Xwedayê
ku min xelas kiriye, bila zimanê
min jî pesna dadmendiya te bi Ze-
bûran ve bide.
15 Ya Xudan, lêvên min veke û
bila devê min pesnahiyên te bide
bihîstin!
16 Ji ber ku tu ji qurbanê ve
kêfxweş nabe, ya na min ê pêşkêşî
te bikira, tu ji qurbana şewitandinê
ve kêfxweş nabe.

[1] Gîhayê Kewan: Vî gîhayî, di peristinên olî de, bona xwîn, av hwd. li ser mirovan an ji tiştên din bikin, mîna demedekî duşuxulandin. Navê wê yî iroyî bi rastî nayê zanîn.

17 Qurbanên Xwedê, ruhek dil-
nizm e, tu dilek poşman û nizm
xor nabînî, ya Xwedê.
18 Bi kerema xwe qenciyê bi Si-
yonê ve bike, kelehên Orşelîmê
biselihîne!
19 Wê çaxê qurbanên bi rastî
hatine pêşkêş kirin, qurbanên
şewitandinê û bi tûmî qurbanên
şewitandinê, dê te xoşnûd bikin.
Wê çaxê dê di pêşkêşgeha te de
ganêran bên pêşkêş kirin.

**Zebûr 52**

1 Bona serekê mûsîkê. Maskîla
Dawid e. Dema Doyegê Edomî
hat û ji Saûl re got: Dawid ket
mala Ahîmelek!
Tu çima bi xerabiyê ve pesnê xwe
didî, ya zorbaz? Xêra Xwedê bi
her timî ye.
2 Zimanê te pêşniyara xerabiyê
dike, mîna gûzanek tûj hîle dike.
3 Tu ji qenciyê zêdetir ji xerabiyê,
ji rastiyê zêdetir ji gotina derewan
hez dike. (Sela.)
4 Gidî tu, yê zimanê bi fen, te ji
her gotina bi xerakirin e, hez kir!
5 Dê Xwedê, heta bêdawîbûnê
te têk bibe, dê te bigre û ji çadira
xwe ve bipijiqîne û ji axa jiyanê
ve reha te rake. (Sela.)
6 Û yên rast vêya bibînin û dê bi-
tirsin û dê bi ken ûsa bibêjin: 7 A
vay, ev zilamê ku nexweste xwe
bisipêre Xwedê, lê belê bi zêde-
yiya hebûna xwe ewle bû, bi kiri-
na fesadiyên xwe xwurt bû!
8 Lê belê ez, mîna darê zeytûna di
mala Xwedê de hêşîn bûye me; ez
heta bêdawîbûnê, bi xêra Xwedê
ve ewle me.
9 Ez her tim şikiryê ji te re dikim,
ji ber ku te vêya kir û li ber pîro-
zên te bi navê te ve hêviyê girê
didim, ji ber ku ew qenc e.

**Zebûr 53**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma Mahalat[1] de, Maskîla Dawid
e. Bêaqil di dilê xwe de dibêje:
Xwedê nîne! Ew xera bûn û karên
mekrûh kirin[2]; yê ku qenciyê dike
tune ye.
2 Ûsa bû ku, Xwedê ji ezmanan
ve li mirovan nihêrt; bona gelo
ka yekî baqil, yekî berê xwe daye
Xwedê heye?
3 Hemû ji rê ve derketin, hemû
bi hev re mirdar bûn, yê qenciyê
dike nîne, ne tenê kesek jî!
4 Ma qey zanîna yên ku sûcan
dikin, nîne? Mîna ku nan bixwin,
gelê min dixwin, bangî Xwedê
nakin.
5 Li wir, li cîhê ku tirs lê nîne dê
pirr bitirsin; ji ber ku dê Xwe-
dê hestiyên kesên dora te girti-

1 Mahalat: Terimek mûsikê, bi bûyinek mezin, sazên hilmî.
2 An jî: Erjengî girt û meşiya.

ne, bişkîne; tuyê wan şermezar
bike; ji ber ku Xwedê wan ji xwe
avêt[1].
6 Xwezîka xelasiya Îsraêlê ji Si-
yonê ve bihata! Dema Xwedê
gelê xwe ji sirgûnê şunda bîne, dê
nifşa Aqûp kêfxweş bibe û gelê
Îsraêlê bicoşe.

**Zebûr 54**

1 Bona serekê mûsîkê. Maskîla
Dawid e. Dema yên Zîfî hatin û ji
Saûl re: Ma Dawid, di nav me de
nayê veşartin? gotin. Ya Xwedê,
min bi navê xwe xelas bike û bi
hêza xwe heqê min bistîne!
2 Ya Xwedê, dua min guhdarî
bike, guh bide gotinên ku ji devê
min ve derdikevin!
3 Ji ber ku yên biyanî êrîşî min
dikin û zordest dixwazin ku canê
min bistînin û Xwedê danenîne
ber xwe. (Sela.)
4 A vay, Xwedê alîkarê min e;
Xudan di nav piştgirtên canê min
de ye.
5 Bila neyarên min, cezayên xe-
rabiyên ku kirine bikişînin, li gor
dilsoziya xwe wan tune bike!
6 Ya XUDAN, ez ê ji dil ve qurbanê
pêşkêşî te bikim; şikiryê ji navê te re
bikim, ji ber ku navê te qenc e.
7 Ji ber ku, te min ji hemû ten-
gasiyên min ve xelas kir û çavên
min tunebûna neyarên min dîtin.

[1] Red kir.

**Zebûr 55**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazên
têlî, Maskîla Dawid e. Ya Xweda,
guh bide duaya min û pişta xwe
nede li bergerîna min!
2 Bala xwe bide û bersivê bide
min! Ramanên min, min bêaram
dike, ez şaş bûme.
3 Ji dengê neyaran, ji zordariya
xeraban; ji ber ku min dixin ten-
gasiyê û bi hêrs, bi ser min ve
tên.
4 Dilê min di hundirê min de janê
dide û tirsehêza mirinê daket ser
min.
5 Tirs û lerizîn min girt û lerizîn
hundirê min dagirt.
6 Xwezîka mîna kevokan bazikên
min hebana! Ji xwe re gotim: Ez ê
bifiriyama û biaram bibûma.
7 Wê demê bireviyama dûriyan,
di çolan de qonax bidama. (Sela.)
8 Li hemberê bayên dijwar û
bahozan, hema min ê sitargehekê
bidîtana.
9 Xeraban şaş bike, ya Xudan, zi-
manê wan tevlîhev bike! Ji ber ku
ez dijwarî û pevketinê di bajêr de
dibînim.
10 Bi şev û roj li ser kelehên ba-
jêr ve digerin; fesadî û neheqî di
nava bajêr de ne.
11 Xerakirin di navenda bajêr
de, zordarî û hîle ji qada wê kêm
nabe.
12 Ger neyarek min biçûk dibî-
ne hebûya; dikarîbûm baldirêjiyê

bikirama, ger yê kanciyê ji min
re dike, neyarek bûya; dikarîbûm
xwe veşartima.
13 Lê belê yê beramberê min tu yî.
Rêhevalê min, hevalê minî nêzîk.
14 Me yê bi hev re hevalbendiyek
şêrîn dikirin û tevî civakê diçûn
mala Xwedê.
15 Bila mirin nişka ve bi wan
ve bigire, bi saxî dakevin diyarê
miriyan! Ji ber ku hundirê wan û
malên wan bi xerabiyê ve tijî ye.
16 Lê ez jî bangî Xwedê dikim,
XUDAN min xelas dike.
17 Ez ê êvarê, sibê û nîvroj ji
kesera xwe ve bigerim û ew dengê
min bibihîze.
18 Ji şerê ku li hemberê min ketine,
bi aşitî canê min xelas kir; ji ber ku
hejmara yê hemberên min zêde bûn.
19 Xwedayê, ji berî bêberîbûnê di
textê xwe de rûniştî, dê bibihîze û
wan biperçiqîne. (Sela.)
Ji ber ku qet nayên guhertin û ji
Xwedê ve natirsin.
20 Wî bi êrîşkirina hevalê xwe,
peymana ku çêkiribû, xera kir.
21 Gotinên devê wî ji rûn xijoktir
in, lê belê di dilê wî de şer heye;
gotinên wî ji rûnê ve nermtir, lê
belê her yek şûrek tazî ne.
22 Barê xwe ji XUDAN re berde
û ew ê ji te re bibe alîkar. Ew tu
carî destûrê nade ku, bila mirovê
rast bilerize!
23 Lê belê tu, ya Xweda, tuyê xe-
raban bavêje kortala mirinê. Dê nê-
viya rojên xwe nebînin yên xayîn û
qesas; lê ez bi te ewle me.

**Zebûr 56**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqama
Kevoka li ser dara Menengûçê ya
dûr de. Miqdama Dawid e. Dema
li bajarê Gatê Filistiniyan wî bin-
dest kiribûn. Bila heyfa te li min
bê, ya Xwedê! ji ber ku mirov
min di bin lingên xwe de dicûn, di
hemûya rojê de êrîş dikin û min
diperçiqînin.
2 Neyarên min, her roj min di bin
lingên xwe de dicûn, zehf bi kancî
êrîş dikin.
3 Dema ez ditirsim, bi te ewle
dibim.
4 Ez bi Xwedê, bi Xwedayê ku
pesnahiya gotina wî didim, ewle
dibim, natirsim!
Ma mirov dikare çi bi min bike?
5 Di hemûya rojê de gotinên min
çewt[1] dikin; di derheqê min de her
tim pêşniyara xerabiyê dikin.
6 Bona fesadiyê diştexilin, kemînê
davêjin, çavnêriyê li gavên min
dikin, dixwazin canê min bistînin.
7 Ma qey dê bi fesadiyên xwe ve
xelas bibin? Ya Xwedê, gelan bi
hêrs ve li erdê bixe!
8 Te êşên ku min kişandine hêj-
mart. Hêstirên çavên min di meşkê
de da berhev kirin! Ma vana di
kitêba te de nehatine nivîsandin?

1 Xelet, xwar.

9 Dema ez bang bikim, dê ne-
yarên min wê demê şunda vekişin;
dizanim, ji ber ku Xwedê li aliyê
min e!
10 Ez bi Xwedayê ku min pes-
nahiya gotina wî daye, ez bi XU-
DANê ku min pesnahiya gotina
wî daye,
11 Ez bi Xwedê ve ewle dibim,
natirsim! Ma mirov dikare çi bi
min bike?
12 Ya Xwedê, min boraqan bona
te qewil kiribû; ez ê qurbanên
şikiryê pêşkêşî te bikim.
13 Ji ber ku te canê min ji mi-
rinê ve xelas kir; lingê min ji
tilpekîbûnê ve parast; da ku, ez
di ronahiya jiyanê de, di hizûra
Xwedê de bimeşim.

**Zebûr 57**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqama
Tune neke de. Miqdama Dawid e.
Dema ji Saûl ve reviya û xwe avêt
şikeftê. Dilovaniyê li min bike, ya
Xwedê, dilovaniyê li min bike! Ji
ber ku canê min xwe disipêre te
û heta ku asîw derbas bibe, ez ê
xwe bisipêrim siya bazikên te.
2 Ez bangî Xwedayê bilind, Xwe-
dayê ku bona min her tiştî kiriye
dikim.
3 Dê ji ezmanan ve bişîne û min
xelas bike; bi yên ku dixwazin min
bieciqînin ve bixeyide. (Sela.)
Dê Xwedê xêr û dilsoziya xwe
bişîne.
4 Canê min di nava şêran de ye,
di nava mirovên agir verdişin de
radikevim; diranên wan mîna
rim û tîra ne, zimanên wan mîna
şûrê tûj.
5 Ya Xweda, bilindahiya xwe, li
ser ezmanan ve bide xuya kirin!
Bila rewnaqiya te hemûya rûyê
erdê dagire!
6 Bona lingê min torê avêtin;
canê min ket; kortalê li rêya min
kolan; ew bi xwe ketin hundirê
wê. (Sela.)
7 Dilê min bi biryar e, ya Xwedê,
dilê min bi qirar e! Ez ê murxan û
Zebûran bibêjim.
8 Hişyar be, ya canê min! Hişyar
be, ya lîr, ya çenk! Ez ê berbangê
hişyar bikim!
9 Di nava gelan de pesnahiyan
pêşkêşî te bikim, ya XUDAN; di
nava gelan de, bi Zebûran pesnê
te bidim.
10 Ji ber ku xêra te digihêje ez-
manan, dilsoziya te digihêje rûyê
ezman.
11 Ya Xweda, bilindahiya xwe, li
ser ezmanan ve bide xuya kirin!
Bila rewnaqiya te hemûya rûyê
erdê dagire!

**Zebûr 58**

1 Bona serekê mûsîkê. Miqdama
Dawid, ya di miqama Tune neke
de. Ya rêvebirno[1]; ma bi rastî jî

[1] Rêvebirno, an jî: Bêzimanno (lalno).

hûn qirara bi dadî didin? Ya mi-
rovno, ma hûn bi rastiyê daraz
dikin?
2 Na! Hûn tim di dilên xwe de
pêşniyara neheqiyê dikin; destên
we zordestiyê diweşînin rûyê erdê.
3 Yên xerab, hîn di rehma dayikên
xwe de ji rê ve derdikevin. Di
bûyîna xwe de bi derew gotinê ve
çewt dibin[1].
4 Jahra wan mîna jahra mara ye;
mîna tûlemarê guhên wî girtî ne.
5 Tûlemarek, ku naxwaze dengê
sêrbazên hoste û efsûnkaran bi-
bihîze.
6 Ya Xwedê, di devê wan de di-
ranên wan bişkîne; rake diranên
kakilê yên şêrê ciwan, ya XU-
DAN!
7 Bila mîna ava diherike û diçe
tune bibin! Dema kevanên xwe
şidandin, bila serê tîrên wan bibe
mîna yê şikestî!
8 Bila bibin mîna şeytanoka her
ku xwe bi erdê ve xij dike dihu-
le, mîna zarokên ji beravêtî wecê
rojê nebînin!
9 Hîn berî ku qazanên we, bi agirê
keleman ve bibhîze, dê ziwa û
hişkê xeraban, bi bahozê ve belav
bibin!
10 Zilamê rast, dema tola hatiye
stendin bibîne, dê kêfxweş bibe û
lingên xwe di xwîna yê xerab de
bişo.

1 Ji rê ve derdikevin.

11 Û wê çaxê dê mirov: Bi rastî jî
xelat ji yên rast re heye, bibêjin.
Bi rastî jî, Xwedayê ku di dinê de
daraz dike heye!

**Zebûr 59**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma: Tune neke de. Miqdama Da-
wid e. Dema Saûl, bona kuştina
Dawid zilam şand û çavnêrî li
mala wî kir. Min ji neyarên min
ve xelas bike, ya Xwedayê min;
ji yên ku li dijî min rabûne, min
ewlekar deyne!
2 Min ji sûckiran ve azad bike û ji
qesasên bi xwîn ve xelas bike!
3 Binêre, bona stendina canê
min kemînê davêjin, yên xwurt
li hemberê min yek dibin, lê belê
serî hilnedam, gunehê min nîne,
ya XUDAN!
4 Min sûc nekiriye, lê dîsa baz
didin û amade dibin. Rabe,
bona alîkariya min û li halê min
binêre!
5 Û tu, ya XUDAN, Xwedayê
serwerê hemû hêzan, Xwedayê
Îsraêlê, bona hemû neteweyan
bi ceza bikî, rabe! Bila heyfa te
bi van xayînên sûcdar ve neyê!
(Sela.)
6 Êvarê vedigerin mîna kûçikan
dihewtin, bi xayîntî di bajêr de
digerin.
7 Binêre, ka çi diweşe ji devê
wan, şûr ji lêvên wan derdikeve,
dibêjin: Ma dê kî bibihîze?

8 Lê belê tu bi wan re dikene, ya
XUDAN, kêfa xwe bi hemû nete-
wan ve tînî.
9 Hêza min tu yî, ez çavnêriyê li
te dikim, ji ber ku tu keleha min î,
ya Xwedê.
10 Xwedayê min bi xêra xwe
pêşbaziyê ji min re dike; Xwedê,
têkçûna neyarên min rê min dide.
11 Wan mekuje, ya na dê gelê min
ji bîr bike; wan bi hêza xwe ve be-
lav bike û nizm bike[1],
ya Xudan, mertala me!
12 Bila ji ber gunehan devê xwe,
ji ber gotina ji lêvên wan derdike-
ve, bikevin dafika xirûra xwe, ji
ber naleta ku dixwînin û derewên
ku dikin!
13 Wan tune bike bi xezeba xwe,
tune bibin û bila biçikin û bila za-
nibin ku, Serweriya Xwedê ji nî-
jada Aqûp, digihêje heta serê rûyê
erdê! (Sela.)
14 Û êvarê vedigerin, mîna kûçi-
kan dihewtin û bi xayîntî di bajêr
de digerin.
15 Bona dîtina xwarinê digerin:
ger têr nebin jî, dikin zûre zûr.
16 Lê belê ez ê jî bona hêza te si-
behê murxan bibêjim û xêra te, bi
kêfxweşiyê bînim ziman,
ji ber ku tu ji min re bû keleh: di
roja minî teng de jî bûyî sitargeh.
17 Hêza min tu yî, ez ê bi Zebûran
pesnê te vedim, ji ber ku Xwedê
keleha min e; Xwedayê ji bo min
xêrê dike ye!

**Zebûr 60**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma Sosina Peymanê de. Miqdama
Dawid ya hînkirinê ye.
Dema Dawid bi Aram-Naharayî-
mayan û bi Aram-Sovayiyan ve
li hev didan û Yoab vegeriya û
di newala Xwê de donzdeh hezar
kesê Edomî kuşt. Te me red kir,
tu li hemberê me sor bû, ya Xwe-
dê, tu hêrs bû, me şunda vegerîne
halê me yî berê!
2 Te erd hêjand, kortalan vekir;
derizên wê çêke, ji ber ku erd di-
lerize!
3 Te tengasiyê da gelê xwe, xem-
rek gêj dike, bi me re da vexwa-
rin.
4 Te alê da yên ku ji te ditirsin,
bona ku li hemberê tîrvanan[2]
vekin. (Sela.)
5 Bi destê xwe yî rastê me
xelas bike, bersivê bide me,
bona ku hezkirên te bigihêjin aza-
diyê!
6 Xwedê, di pîroziya xwe de ûsa
axifî: Ez ê Şekemê bi kêfxweşiyê
ve par bikim û newala Sûkotê
bipîvim.
7 Gîlad ya min e, Manaşşe jî ya
min, Efrayîm kumzirxa min,
Cihûda çoyê daraziya min e.

[1] An jî: Wan daxîne jêr.

[2] Li hemberî tîrvanan, an jî: Di oxra rastiyê de.

8 Moab legana minî xwe şuştinê,
ez ê pêlava xwe bavêjim[1] ser
Edomê; ya Filistîn, ji bo min bi
kêfxweşiyê ve biqêre!
9 Dê kî min bibe bajarê bi keleh?
Kî yê heta Edomê rê nîşanî min
bide?
10 Ya Xwedê, ma te me red ne-
kir? Tu êdî pêşengiyê ji artêşên
me re nake?
11 Li dijî neyaran, alîkariyê bi me
re bike! Ji ber ku alîkariya miro-
van vala ye.
12 Em bi Xwedê ve serfiraziyê
qezenc dikin; ew neyarên me di-
pelixîne.

**Zebûr 61**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazên
têlî. Zebûra Dawid e. Ya Xwedê,
lavaya min bibihîze, guh bide dua
min!
2 Ez ji aliyê dinî rûyê erdê bangî
te dikim, dema xem dikeve
dilê min; min derxe ser zina-
rekî bilind ku ez nikaribim bi-
gihêjimê.
3 Ji ber ku tu bona min bû stargeh,
li dijî neyaran bû qûleyek zexm.
4 Ez dixwazim ku heta bê-
dawîbûnê di çadira te de rûnim
û xwe bidim siya bazikên te.
(Sela.)
5 Ji ber ku te, ya Xwedê, te qew-
lên min bihîst, te mêrasa yên ku ji
navê te ditirsin da min.
6 Rojan tevî rojên qiral dikî, bila
salên wî bibin mîna dewran[2]!
7 Bila di hizûra Xwedê de, heta
bêdawînê di texta xwe de rûnê.
Wî bi xêr û dilsoziya xwe ve bi-
parêze!
8 Wê çaxê, ez ê pesnahiya navê
te bi Zebûran ve bidim û her roj
qewlên xwe bînim cîh.

**Zebûr 62**

1 Bona serekê mûsîkê Yedûtûn.
Zebûra Dawid e. Canê min tenê
di Xwedê de aramiyê dibîne, xe-
lasiya min ji wî ve tê.
2 Zinarê min, xelasiya min, keleha
min tenê ew e, ez pirr nalerizim.
3 Bona eciqandina yekî, hûn ê hîn
heta çi wextê, hemû pev re êrîşî
wî bikin? Mîna êrîşî dîwarekî
xwar, êrîşî bendekî ji cîh ve der-
ketî be?
4 Yek ramana wan, wî ji jor ve
daxînin, ji derewan ve zewqê di-
girin; bi devê xwe dua xêrê dikin;
lê belê ji hundirê xwe ve naletê
dikin. (Sela.)
5 Ya canê min, tenê di Xwedê de
aramiyê bibîne! Ji ber ku hêviya
min di wî de ye.

1 Pêlava xwe bavêjim: Li gor kevneşopên berê, avêtina pêlavê, dihat mana xwedî derketina dereki (Binêr. 2.Samûyêl. 8:13; 1.Dirokan.18:12).

2 An ji: Mîna sedsalan.

6 Zinarê min û xelasiya min, qû-
leya min ya bilind tenê ew e, ez
nalerizim.
7 Xelasî û rûmeta min bi Xwedê ve
girêdayî ye, zinara min ya zexm,
sitargeha min di Xwedê de ye.
8 Ya gelê min, her tim bi wî ba-
wer bibe! Dilê xwe li ber wî
dawişînin[1]! Ji ber ku Xwedê sitar-
geha me ye. (Sela.)
9 Bi rastî mirovên rêzî tenê hilmek,
mirovên biesil jî derewek in. Dema
têkevin qentarê, bilindî jor dibin,
her du jî ji hilmekê siviktir in.
10 Bi zordestiyê ve ewle nebin,
pesnê xwe bi malên talanê ve ne-
din û dema ku hebûna we zêde
bibe jî, dil bi wê girê nedin!
11 Xwedê carekî tiştek got; du
tiştî bihîstim: Hêz ya Xwedê ye;
12 Xêr jî ya te ye, ya Xudan! Ji
ber ku, tu berdêla kirina[2] her kesî
dide wan!

**Zebûr 63**

1 Dema li çola Cihûda bû. Zebûra
Dawid e. Ya Xwedê, tu yî Xwe-
dayê min! Ez di dema berbangê
de li te digerim, canê min bi te ve
tî bûye, di warekî sixre, bêav û
zehmetî, ez bi hemû hebûna xwe
li te digerim.
2 Mîna li cîhê pîroz ve, li te nêri-
yam, bona hêz û rewnaqiya te bi-
bînim!
3 Ji ber xêra te, ji jiyanê ve qenctir
e; bo vê yekê lêvên min te bilind-
tir dikin.
4 Ez ê heta dawiya temena xwe
pesnahiyan pêşkêşî te bikim, bi
navê te destê xwe rakim.
5 Mîna ku bi xwarinên dewle-
mend ve têr bibe canê min û bi
lêvên bikêf dê devê min pesnahi-
yan pêşkêşî te bike.
6 Dema dirêjî livînên xwe dibim,
te di bîr tînim, di hemûya nobe-
dariyên şevê de hûr û kûr te di-
fikirim.
7 Ji ber ku tu ji min re bû alîkar û
di siya bazikên te de kêfxweşiya
xwe tînim ziman.
8 Canê min bi hijdîn, bi te ve di-
gire, destê te yî rastê, dibe alîkarê
min.
9 Lê belê yên ku dixwazin canê
min bistînin, dê bikevin bin erdê,
cîhê ku herî kur e.
10 Dê ber devê şûr ve bên avêtin,
ji çeqelan re bibin xwarin.
11 Lê dê qiral jî di Xwedê de
kêfxweşiyê bibîne; hemû kesên bi
navê wî ve sond xwarine dê pesnê
bidin, ji ber ku dê devê derewçi-
yan bên girtin.

**Zebûr 64**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ya Xwedê, dema gazin-
can bikim, guh bide dengê min.

[1] Birijînin.

[2] Xebat, kar.

jiyana min ji tirsa neyaran ve bi-
parêze!
2 Ji pêşniyarên veşartî yên xera-
ban, ji teşqela wî kiriye sûcdar ve
min bisitirîne!
3 Wan zimanê xwe mîna
şûrekî tûj kirine, gotinên xwe
yî tahl, mîna tîrekê dane ber ar-
mancê.
4 Bona di kemînên xwe de bigirin
ser mirovê bêguneh, nişka ve lê
dixin û qet natirsin.
5 Di nava karên xerab de, xwe
xwurt dikin û dibêjin ku: Werin
em bi dizîka dafikê deynin, ma kî
dikare me bibîne?
6 Neheqî kirinê difikirin, dibêjin:
Me pîlanek bêqisûr çêkir! Dil
û hundirê mirovan razek kûr e,
nayê zanîn.
7 Lê belê Xwedê tîrê bavêje wan,
ji nişka ve tîrek tê û nişka ve
birîndar bibin.
8 Û dê ji ber zimanên xwe, rastî
têkçûnê bên; her kesê ku halê wan
dibîne, dê bi qerf serê xwe ji wan
re kil bikin.
9 Û hemû mirov dê têkevin tirsê û
dê karê Xwedê bidin bihîstin û li
ser kirinên wî bifikirin.
10 Dê mirovê rast di XUDAN de
kêfxweşiyê bibîne û xwe bisipêrî
wî; dê hemûyên dil paqij pesnahi-
ya wî bidin.

**Zebûr 65**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Qesîdeyek. Ya Xwedê,
li Siyonê pesnahî li benda te ye[1],
dê boraqên ji te re hatine qewil ki-
rin bên cîh.
2 Ya tu, yê duayan dibihîze! Dê
hemû mirov bên te[2].
3 Ez di bin sûcên xwe de perçi-
qîm, lê belê tu serîhildanên me
efû bike.
4 Xwezî li kesên ku, te bona di
hewşên te de rûnê bijart û nêzîkî
xwe kir! Em ê têrî nahmeta mala
te, yê perestgeha te yî pîroz bi-
bin.
5 Ya Xwedayê xelasiya me, bi
kirina karên tirsehêz, tu li gor
dadiya xwe bersivê dide me. Tu
hêviya hemûyên li çar hawirdora
rûyê erdê û yên behrên dûr î!
6 Yê bi qudretê ve dixemile, bi
hêza xwe ve çiyayan ava kiriye.
7 Yê xurmîniya behran, gurmî-
niya şepêlan û tevliheviya gelan
disekinîne tu yî.
8 Û yên li serê dinê yê din dijîn,
li ber nîşanên te bi tirsê dikevin.
Tu ji rojhilat heta rojava, bi miro-
van ve qêrînên kêfxweşiyê dide
avêtin.
9 Tu li axê dinêre û wê bi berdar
dikî, wê zehf dewlemend dikî, ya
Xwedê, çemên te bi avê ve tijî ne;

---

1 Di Septûaginta û Suryaniti de pesnahî li benda te ye, di Îbranitiyê de, bêdengi bona te pesnahi ye.
2 Li te şunda vegerin, an ji: Bên cem te.

tu dexlê ji mirovan re peyda dikî!
Ji ber ku tu axê ûsa amade dikî:
10 Tu tîrşên ku gîsin vekiriye, têra
xwe biav dikî. Bestikên wê serrast
dikî, bi baranê ve axê nerm dikî,
bereketê beşdarî dexlên wan dikî.
11 Te bi qenciyê ve sala xêra xwe
bi tac kir û rêçên te rûn diheri-
kînin.
12 Çêregeha qiran hêşîn dibe û
hemû gir bi kêfxweşiyê ve dixe-
milin.
13 Mêrg bi keriyan ve tijî dibin;
deşt bi zad ve tê nuxumandin; ew
ji kêfxweşiyê ve diqêrin, belê,
murxan dibêjin.

**Zebûr 66**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Qesîdê ye. Ya hemûya rûyê erdê;
bona Xwedê qêrînên kêfxweşiyê
biqêrin!
2 Ji bilindahiya navê wî re Ze-
bûran bibêjin, pesnahiyên bi rew-
naq pêşkêşî wî bikin!
3 Ji Xwedê re: Çi karên te yî tir-
sehêz hene! bibêjin. Hêzek te yî
ûsa mezin heye ku,
neyarên te li ber te xwar dibin.
4 Hemûya rûyê erdê peristinê ji
te re dikin û Zebûran dixwînin: bi
murxan ve pesnahiya navê te di-
kin. (Sela.)
5 Werin û li kirinên Xwedê bi-
nihêrin! Çi karên tirsehêz di nav
mirovan de çêkir: 6 Behrê werge-
rand reşayiyê; ew ji çem bi peyatî
derbas bûn; li wir, em di wî de
kêfxweş bûn.
7 Bi qudreta xwe, heta bê-
dawîbûnê serweriyê dajo; çavên
wî bi balkêşî li netewan dinêrin;
bila yên serî hildidin li pêy xirûrê
ve nekevin! (Sela.)
8 Ya gelno, ji Xwedayê me re
şikiryê bikin, pesnahiyên wî bidin
bihîstin.
9 Yê ku canê me di jiyanê de bigi-
re û yê destûrê nade ku lingê me
bişemite, ew e!
10 Ji ber ku te me ceriband, ya
Xwedê, mîna mirov zîvê safî
dike, te me safî kir.
11 Te me xist torê, barê giran li
pişta me kir.
12 Te mirovan derxistin ser serê
me; em ji agir û avê derbas bûn,
lê belê dawiyê te me gîhand zê-
deyiyê[1].
13 Ez ê bi qewlên şewitandinê ve
têkevim mala te, qewlên xwe bî-
nim cîh;
14 Qewlên, dema ez di nava ten-
gasiyê de bûm, yên ji lêvên min
diweşiyan û ji devê min derdiketin.
15 Bi kizirandina beranên hatine
şewitandin û ji heywanên xwurt,
ez ê qewlên şewitandinê pêşkêşî
te bikim; nêriyan, gayan qurban
bikim. (Sela.)
16 Ya hûn, hemûyên ji Xwedê ve
ditirsin, werin û guhdarî bikin, wî

[1] An ji: Zêdeyiya kêfxweşiyê.

ji bona canê min çi kiriye, ez ji we re bibêjim.
17 Ez bi devê xwe li ber wî geriyam û pesnahiya wî ji zimanê min ve neket.
18 Ger di dilê xwe de cîh bidama xerabiyê, Xudan min guhdarî nedikir.
19 Lê belê Xwedê min guhdarî kir, guh da dengê duaya min.
20 Bila pesnahî ji Xwedê re be, ji ber ku dua min şunda venegerand û xêra xwe ji min ve veneşart!

**Zebûr 67**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazên têlî. Zebûra Qesîdê ye. Bila Xwedê xêrê bi me re bike û me pîroz bike, ronahiya wecê xwe li ser me ve bibiriqîne. (Sela.)
2 Ûsa ku, bila li rûyê erdê rêya te, di nava hemû gelan de hêza te yî xelasiyê bê zanîn!
3 Bila gel şikiryê ji te re bikin, ya Xwedê; hemû gel şikiryê ji te re bikin!
4 Bila netewe kêfxweş bibin, ji kêfxweşiyê ve biqêrin; ji ber ku tu gelan bi dadî daraz dikî û rê nîşanî neteweyên li rûyê erdê ne, didî. (Sela.)
5 Bila gel şikiryê ji te re bikin, ya Xwedê; hemû gel ji te re şikir bikin!
6 Erd dexlê xwe da; Xwedê, Xwedayê me, me pîroz dike.
7 Xwedê me pîroz dike û yên li çar hawirdora dinê ne, bila ji wî bitirsin!

**Zebûr 68**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûrek Qesîdê, ya Dawid e. Bila Xwedê rabe, neyarên wî belav bibin! Û bila yên ji wî dikerihin, ji ber wî birevin!
2 Bila wan belav bike, mîna dûyê belav dibî; mîna şimaya li ber agir duhule; bila yên xerab li ber Xwedê tune bibin!
3 Lê belê yên rast bila kêfxweş bibin, bila li ber Xwedê cejnê bikin û bi dilxweşiyê bicoşin.
4 Murxan ji Xwedê re bibêjin, pesnahiya navê wî bi Zebûran bidin! Ji siwarê ku dê çolan derbas bike re rê amade bikin[1]; navê wî XUDAN e, li ber wî cejnê bikin!
5 Xwedê di mala xwe yî pîroz de, bavê sêwiyan û parêzgerê pîrekên bî ye.
6 Xwedê malê dide bêkesan; girtiyan digehîne azadî û dewlemendiyê. Lê belê yên serî hildidin, li cîhê bê av ve rûdinin.
7 Ya Xwedê, dema te pêşengiyê ji gelê xwe re kir û tu di çolê de meşiya; (Sela.)

1 Rê ji siwarê ku dê çolan derbas bike re amade bikin: An ji: Murxan pêşkêşî yên ku li ewran siwar bûye bikin.

8 Wê çaxê erd lerizî, ji ezmanan
baran vala bû li ber Xwedê, Çi-
yayê Sînayê lerizî,
li ber Xwedê, Xwedayê Îsraêlê.
9 Te gellek baranan barand, ya
Xwedê; welatê xwe yî westiyaye
zindî kir.
10 Civaka te di hundirê wê de
rûniştin; te ji belengazan re, ji
qenciya xwe amade kir, ya Xwe-
dê!
11 Xudan emir da; civakek pîre-
kan ya mezin mizgîniyê dan
bihîstin: 12 Direve, direve qiralên
artêşan! Pîrekên li benda xanî ne,
xenîmetê par dikin.
13 Dema hûn di nava kozikan de
radikevin, hûn dibin mîna kewekî
bazikên wê zîv e û perîkên wî bi
zêrên dibiriqîne ve xemiliye.
14 Gava yê ku hêza wî besî her
tiştî ye qiralan belav dikir, wekî
berf li Çiyayê Salmonê bibare sipî
dibû.
15 Ya Çiyayê Başanê, Çiyayê
Xwedê! Ya Çiyayê Başanê, çi-
yayê şaxên wê bilind!
16 Ya çiyayên mezin, çima hûn
bi çewtî, li çiyayê ku Xwedê di-
xwaze li wir bicîh bibe dinihêrin?
Belê, XUDAN heta bêdawiyan di
wê de rûdine.
17 Erebeyên Xwedê, yên cengê
deh hezar û deh hezar û bi hezar
û hezar in; Xudan di navenda wan
de ye, mîna li Sînayê bû, di pîro-
ziyê de ye.
18 Tu derket bilindahiyan û te yên
mehkûm ajot[1]; ji mirovan, heta ji
yên serî hildane jî xelatan girt.
Bona li wir bi cîh bibe, ya XU-
DAN Xwedê.
19 Bila pesnahî ji Xudanê ku her
roj barê me dikişîne û me xelas
dike re be! (Sela.)
20 Xwedê ji me re, Xwedayek xe-
lasker e, ji mirinê ve xelas kirin,
taybetiya Xudan XUDAN e.
21 Bê şik, Xwedê serê neyarên
xwe, seriyê bimû, yên ku bisûc ve
dijîn dieciqîne.
22 Xudan: Ez ê wan ji Başanê, ji
kûraniya behrê ve bînim, dibêje.
23 Ûsa ku, bila lingên xwe di xwîna
neyarên xwe de dakin, zimanê kûçi-
kên wan jî ji wan para xwe bigire.
24 Ya Xwedê, hatina civaka ser-
firaziya te, hatina Xwedayê min,
Qiralê minî Cîhê Pîroz dîtin.
25 Di pêşiyê de dengbêj, di da-
wiyê de jî sazbend, di navê de jî,
keçikên li erbanê dixin.
26 Ya hûn, yên ji nîjada Îsraêlê ve
tên, di civakê xwe de pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN, Xwedê bikin!
27 Li pêşiyê eşîra herî biçûk
Benyamîn, bi ajaweyek Serokên
Cihûda û serokên Zebûlûn û se-
rokên Neftalî li wir in!
28 Ya Xwedê, hêza xwe, ji perest-
geha xwe yî li Orşelîmê ye bide
xuya kirin!

[1] An ji: Bindest kir.

29 Hêza ku tu bona me duşuxulîne,
ya Xwedê, dê qiral xelatan pêşkêşî
te bikin.
30 Bi heywanê di nava qamîşan
de dijî re bipeke, naxira ganêr û
golikan ya gelan[1],
bi lingê xwe bieciqîne, yên ku
dilbijandine zîvan, gelên ji şer ve
kêfê digirin belav bike!
31 Dê ji Misirê ve şandî werin,
Kûşî, destên xwe bi lez ber bi
Xwedê ve rakin.
32 Ya qiraliyên rûyê erdê, Ze-
bûran ji Xwedê re bêjin, bi mur-
xan ve pesnahiya Xudan bidin.
(Sela.)
33 Ji ber ku pesnahiya yê li ezma-
nan, yê li ezmanên qedîm ve si-
war bûyî! A vay, bi dengê xwe, bi
dengê xwe yî xwurt digurme!
34 Hêza Xwedê binasin! Bilin-
dahiya wî li ser Îsraêlê ve û hêza
wî di ezmanan de ye.
35 Tu çiqas bisawêr î, ya Xwe-
dê, di Cîhê xwe yî Pîroz de! Bila
pesnahî ji Xwedayê Îsraêlê re, ji
Xwedayê ku hêz û qudretê dide
gelê xwe re be!

**Zebûr 69**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma Sosinan de. Zebûra Dawid e.
Min xelas bike, ya Xwedê! Ji ber
ku av gîhaştin canê min!
2 Ez di heriya bêbinî de diçikim,
cîhekî pêlê bikim nîne; ez ketim
avên kûr û bi şêlavan ve ketim.
3 Ji qêrîn avêtinê ve westiyam,
qirika min ziwa bû; ronahiya ça-
vên min ditefin, hingê ez li benda
Xwedayê xwe me.
4 Yên ku bêsedem ji min dikeri-
hin, ji porên serê min zêdetir in;
neyarên min yên bêheq, yên ku
dixwazin min tune bikin xurttir
in; ez hewcedar im, tiştên ku ne-
dizîme şunda vegerînim.
5 Tu bêaqiliya min dizane, ya
Xwedê û sûcên min ji te ve ne
veşartî ne.
6 Ya Xudan, ya XUDANê serwerê
hemû hêzan; bila yên ku hêviya
xwe bi te ve girêdane, di rûbalî
min de neşermin! Ya Xwedayê Îs-
raêlê, bila yên ku li te digerin; di
rûbalî min de rezîl nebin!
7 Ji ber, di oxra te de baldirêjiyê
ji heqaretan ve kirim, şermezarî
wecê min girt.
8 Ez ji birayên xwe re xerîb, ji
zarokên dayika xwe yî heq dûr
mam.
9 Ji ber ku xîreta min ji bo mala te
xerc kir, min xwar û heqaretên ji
te re hatin kirin, bi ser min ve hat
û daket.
10 Gava rojiyê girtim û giriyam,
dîsa heqaretê li min kirin.

---

1 Gotina heywan yê ku di vir de derbas dibe. Misirê. (naxira) golik û gayan ji neteweyên din yên biçûk û mezin nîşan dide.

11 Dema ketim nav cilikan, ji zi-
manê wan re bûm çîrok.
12 Yên li deriyê bajêr ve rûniştine,
keftûlefta min dikin û ez bûm ki-
lama serxweşan.
13 Lê belê duaya min, ji te re ye,
ya XUDAN, ya Xwedê, dema te
bi zêdeyiyê hezkirina xwe,
bi xelaskirina xwe yî ewlekar li
cîh dît, bersivê bide min!
14 Min ji heriyê ve xelas bike û
ez tê de noq nebim! Ez ji yên ku
ji min dikerihin û ji avên kûr ve
xelas bibim!
15 Bila şêlav min bi xwe re
nekişînin û balûpal min danequr-
tîne û kortala mirinê devê xwe li
ser min negre!
16 Bersivê bide min, ya XUDAN!
Ji ber ku xêra te qenc e. Bi dilova-
niya xwe yî mezin, wecê xwe ber
bi min bide!
17 Û wecê xwe ji qûlê xwe
veneşêre, ji ber ku ez di tengasiyê
de me; hema bersivê bide min!
18 Nêzîkî min bibe, canê min xe-
las bike; neyarên min ji serê min
ve bigire!
19 Tu bi, çawa heqaretê li min
kirin, şermezarî û rezîltiya min
dizanî; hemû neyarên min li ber
te ne.
20 Heqaretê dilê min şikestand û
ez bi derd im, li benda yekî ku êşê
min bi min re par bike mam, der-
neket; li benda yekî ku xemrevî-
niyê li min bike bûm, lê nedîtim.
21 Û jahrê xistin nav xwarina min
û gava tî bûm, sîrkê dan min.
22 Sifra li ber wan, bila ji wan re
bibe dafik û bila bona alîkarê wan
bibe feq!
23 Bila çavên wan tarî bibe, ne-
bînin! Her tim pişta wan bilerizîne!
24 Xezeba xwe bi ser wan ve
bibarîne û bila agirê hêrsa te
bigîhêje wan!
25 Bila qesrên wan vala bimînin,
yekî ku li çadira wan rûnê, tune
be!
26 Ji ber, zilmê li mirovê ku te lê
xistiye dikin û êşa mirovên ku te
birîndar kiriye diaxifin.
27 Hemû neheqiyên wan biceza
bike û bila ji aliyê te ve nên safî
kirin!
28 Bila navên wan ji pirtûka ji-
yanê ve bên paqij kirin û bi rastan
ve, li cem hev neyên nivîsandin!
29 Lê ez jî hatime perçiqandin
û bi xem im; bila xelasiya te, ya
Xweda, ji min re bibe kelehek!
30 Ez ê pesnahiya navê Xwedê bi
murxan ve bidim û bi şikirya xwe,
wî bilindtir dikim!
31 Û vêya dê XUDAN, ji gayek,
ji gayek bi qiloç û neynûk ve zê-
detir dilxweş bike.
32 Bila dema yên belengaz vêya
bibînin, kêfxweş bibin; ya hûn,
yên berê xwe dane Xwedê, bila
dilê we geş[1] bibe!

[1] Bi can bibe.

33 Ji ber ku, XUDAN xizanan di-
bihîze û gelê xwe yî bindest biçûk
nabîne.
34 Pesnahiyan pêşkêşî wî bikin,
ya ezman, erd, behr û hemû zin-
diyên di wan de ne!
35 Ji ber ku dê Xwedê Siyonê
xelas bike û bajarên Cihûda bise-
lihîne û dê gel, li wir bi cîh bibin
û bibin xwediyê wir. 36 Û dê za-
rokên qûlên wî wir bi mêrasî big-
rin; yên ku ji navê wî hez dikin li
wir rûnin.

**Zebûr 70**

1 Bona serekê mûsîkê. Bona
pêşkêşiya bîranînê. Zebûra Da-
wid e. Ya Xwedê, min bi lez xe-
las bike! Were alîkariya min, ya
XUDAN!
2 Bila yên ku dixwazin canê min
bistînin, bişermin! Bila wecê
wan sor bibe, bila şunda vegerin
yên ku zirara min dixwazin û re-
zîl bibin!
3 Yên ku dibêjin: Ox! Ox! Bila ji
şermezariya xwe şunda vekişin.
4 Bila di te de kêfxweşî û şahiyê
bibînin, hemûyên ku berê xwe
dane te! Tim: Xwedê bilind e! bi-
bêjin; yên ku bêriya xelas kirina
te kirine!
5 Lê ez jî xizan û belengaz
im; ya Xwedê, bona alîkariya
min lez bike! Alîkar û xelaskerê
min tu yî, dereng nemîne, ya
XUDAN!

**Zebûr 71**

1 Ya XUDAN, ez xwe disipêrim
te: Min tu carî şermezar neke!
2 Bi dadiya xwe min xelas bike, ji
talûkê ve dûr bixe! Guh bide min
û min xelas bike!
3 Bibe zinarê sitargeha min, ya ku
ez karibim tim serî bidimê! Te ji
bo xelasbûna min emir da; ji ber
ku zinar û keleha min tu yî.
4 Ya Xwedayê min, min xelas
bike; ji destê xeraban, ji lepê
neheq û xedaran!
5 Ji ber ku hêviya min tu yî, ya
Xudan, XUDAN; ji ciwantiya
min ve, alîkarê min tu yî.
6 Ji ber ku ji roja bûyîna xwe
ve ez bi te ewle me, yê ku min
ji rehma dayikê ve derxistiye tu
yî, pesnahiyên min her tim ji te
re ne.
7 Ez bona pirran bûme wekokek
nuwaze, lê belê tu, sitargeha minî
xwurt î.
8 Ji devê min, pesnahiya bona te
kêm nabe, di hemûya rojê de, bi-
lindahiya te di bîr tînim.
9 Gava ez kalepîr bibim, min red
meke; gava hêza min biçike, min
neterikîne!
10 Ji ber ku neyarên min,
qala min dikin û yên ku li ben-
da canê min in, bi hev û din
re dişêwirin: 11 Xwedê wî te-
rikand dibêjin. Berra wî bidin û
wî bigirin; ji ber, kesî ku wî xelas
bike nîne!

12 Ya Xweda, ji min ve dûr ne-
sekine; ya Xwedayê min, bi lez
were alîkariya min!
13 Bila bişermin, tune bibin yên
ku li dijî canê min in! Têkevin
şermezarî û rezaletê, yên ku xera-
biya min dixwazin!
14 Lê belê ez her tim hêvîdar im û
ez ê bona te pesnahiyê li ser pes-
nahiyê rêz bikim.
15 Di hemûya rojê de rastiya te,
xelaskeriya te bînim ziman; ji ber
ku ez hêjmara wan nizanim.
16 Ya Xudan, XUDAN, ez ê
werim, egîdiyên te, tenê dadiya te
bidim bihîstin!
17 Ya Xwedê! ji zarokantiya min
ve te min perwerde kir û ez hîn jî
nuwazeyên te tînim ziman.
18 Û ger ez kalepîr bibim û sipîk
jî bikevin porê min, min neterikî-
ne, ya Xwedê! Heta ku hêza te ji
nifşeya ku bê re, qudreta te ji yên
paşê werin re bibêjim!
19 Û ya Xwedê, rastiya te di-
gihêje ezmanan, te karên mezin
çêkir; ma yê wekî te heye, ya
Xwedê?
20 Te ku, gellek tengasiyên xe-
rab nîşanî min da, tuyê dîsa jiyanê
bidî min û min ji kûritiya erdê ve
derxinî.
21 Tuyê birêziya min zêde bikî û
dîsa jî xemrevîniyê li min bikî.
22 Ez ê jî, pesnahiya te, belê,
pesnahiya dilsoziya te, bi çenkê
ve bidim ya Xwedayê min! Ez
ê li lîrê bixim û bi Zebûran
pesnahiya te bidim, ya Pîrozê
Îsraêlê!
23 Dema bi Zebûran pesna te bi-
dim, bi lêvên xwe, bi canê xwe, ez
ê kêfxweşiya xwe bînim ziman, ji
ber ku te min xelas kir.
24 Zimanê min jî, di hemûya rojê
de, dê qala rastiya te bike; ji ber
ku yên xerabiya min dixwazin,
fedî kirin û rezîl bûn.

**Zebûr 72**

1 Zebûra Silêman e. Ya Xwedê,
dadiya xwe bide qiral û rastiya
xwe jî bide lawê qiral!
2 Bila gelê te bi rastiyê û qûlên
te yên belengaz bi dadiyê ve bide
daraz kirin!
3 Bila çiya û gir, bi dadî dewle-
mendiyê ji gel re bînin!
4 Bila mafê belengazan bide, za-
rokên xizanan xelas bike û zali-
man jî biperçiqîne!
5 Heta ku heyv û roj bisekine, ji
nifşe, heta nifşeyan bila mirov ji
te bitirsin[1].
6 Bila mîna barana dikeve mêrga
ku nû hatiye çinandin, mîna ba-
ranên bi bereket yên axê av dide
bibe!

[1] Di Septûaginta de bila qiral di tûmiya nifşeyan de biji, di Îbranitiyê de bila di tûmiya nifşeyan de, ji te bitirsin.

7 Di rojên wî de bila rastî rabe û
geş bibe û heta ku heyv tune bibe,
bila dilxweşî hebe;
8 Bila ji behran heta behran ser-
weriyê bajo û ji çemê Feratê, heta
seriyê rûyê erdê!
9 Bila eşîrên çolê li ber wî çongên
xwe deynin û neyarên wî, tozê bi-
alêsin.
10 Bila qiralên Tarşîş û giravan,
xeracê ji wî re bînin, qiralên Şeba
û Seba, xelatan pêşkêşî wî bikin!
11 Belê, bila hemû qiral li ber wî,
bi dev û rû herin erdê, hemû nete-
we qûlitî ji wî re bikin!
12 Ji ber, ew xizanê ku alîkariyê
dixwaze û lawazê bê alîkar xelas
dike.
13 Heyfa wî bi xizan û lawaz ve
tê û canê belengazan xelas dike.
14 Canê wan ji zorê û zordestiyê
ve azad dike û xwîna wan, di çavê
wî de bi qîmet e.
15 Bila qiral bijî! Bila zêrên Şeba
bidin wî, bêsekin bona wî dua
bikin, bila di temamiya rojê de
pesnahiya wî bidin!
16 Bila li welat û li serê çiyayan
genim zêde be! Bila dexlên wê
mîna Lubnanê bi berdar be û gelê
bajêr mîna gîha biweşin zêde bi-
bin!
17 Bila navê qiral, heta bêdawîbûnê
bijî; heta ku roj hebe, bila navê wî
hebe; bila bi navdîtiya wî mirov
bên pîroz kirin; bila hemû netewe
bibêjin: Xwezî li wî!
18 Bila pesnahî ji XUDAN, Xwe-
dê re, ji Xwedayê Îsraêlê re be, yê
nuwazeyan diafirîne, tenê ew e!
19 Û bila heta bêdawîbûnê pes-
nahî ji navê wî yê pîroz re be! Û
hemûya rûyê erdê bi bilindahiya
wî ve tijî be! Amîn, belê, Amîn!
20 Duayên Dawidê lawê Îşay li
vê derê diqede.

PIRTÛKA SÊWEMÎN (3)

**Zebûr 73**

1 Zebûra Asaf e. Bi rastî Xwedê ji
Îsraêlê re, ji yên ku dilê wan paqij
in re qenc e.
2 Lê belê ez jî, lingên min li ser
xijbûnê bû, kêm mabû ku gavên
min bişemitiyana.
3 Ji ber, her ku dewlemendiya xe-
raban didîtim, çavnebariyê li kan-
can re dikirim.
4 Ji ber ku di mirina wan de êş
tune û bedena wan bi tenduristî
ye û xwurt e[1].
5 Derdê kesekî din nizanin û mîna
wan zehmetê nakişînin.
6 Bo vê yekê, xirûr gerdeniya
wan e, zordarî jî mîna kincên ku
wan duxumîne ye.
7 Ji xwurtbûnê, çavên wan ber
bi derve hol dibe; dilê wan, mîna
beroşa xerabiyê dikele.

1 Bedena wan bi tendurist û xwurt e; an ji: Gava bimirin êşê nakişinin, bedenên wan xwurt e.

8 Henekê xwe bi mirovan ve
dikin û bi nêta xerab diaxifin; ji
jor ve dinêrin; bi zordestî tehdît
dikin.
9 Li hemberê ezmanan devê xwe
vedikin û zimanê wan, li rûyê
erdê digere.
10 Ji ber vêya, gelê wî jî vedigere
wan û bi wan ve gellek avê dide
vexwarinê.
11 Dibêjin ku: Xwedê çawa diza-
ne? Û ma zanîna Bilindê Bilindan
heye?
12 A vay, yên xerab ûsa ne û tim
bêxem, her tim hebûna xwe zêde
dikin.
13 Ûsa tê fêhm kirin ku, li cîhê
vala dilê xwe paqij girtime û
bi gotina bêsûc im, destê xwe
şuştime;
14 Di hemûya rojê de ez xwe
dikesirînim û her sibê ezabê
dikişînim!
15 Ger bigotama: Ez jî mîna wan
biaxifim, dibe ku îxanetê ji za-
rokên te re kiribama.
16 Dema bona fêhmkirina wê fi-
kirîm, ew di çavên min de xeba-
tek zor bû.
17 Heta ku ketim perestgeha
Xwedê û wê çaxê fêhm kirim ku,
ka dê dawiya wan çawa be.
18 Bi rastî jî, tu wan datîne cîhê
şematokî, ber bi têkçûnê ve dihe-
rikînî.
19 Çawa jî di demekekê de wêran
bûn, di nava tirsehêzê de tune bûn!
20 Xewn, bona mirovekî hişyar
bûyî çawa be, dema tu jî hişyar
bibî, ya Xudan, dîtina rûyê wan
xor bibîne.
21 Dema dilê min tehl bû[1] û gur-
çikê min bi êşê ve tijî bû,
22 Ez bêaqil û bêzanîn û li ber te
mîna heywanekî bûm.
23 Dîsa jî her tim bi te re me. Tu
bi destê minî rast ve digirî.
24 Bi şîretê xwe ve rê nîşanî min
didî û paşê jî min digehînî bilin-
dahiyê.
25 Ma xeynî te, li ezmanan kî yê
min heye? Û xeynî te, tu kesî na-
xwazim li rûyê erdê.
26 Dibe ku bedena min û dilê min
biqede, lê belê hêza dilê min û
para min her tim Xwedê ye.
27 Bê şik, yên dûrî te bisekinin,
dê tune bibin; tuyê yên ku bêwe-
fayî ji te re kirine, ji holê ve rake.
28 Lê belê bona min, ya herî qenc
nêzîkayiya Xwedê ye. Bona ku
hemû karên wî bidim bihîstin,
Xudan, XUDAN ji xwe re kirime
sitargeh.

**Zebûr 74**

1 Maskîla Asaf e. Ya Xwedê, bo
çi te me heta bêdawîbûnê red kir?
Bo çi li dijî mîhên mêrga te hêrsa
te heye?
2 Civaka ku tu di derbasbûnê de
lê xwedî derketibû, di bîra xwe de

[1] Şikiya.

bîne, eşîra ku te, bona bibin gelê
te yî heq, te wan xelas kiribû û
Çiyayê Siyonê ya ku te li ser wê
xanî ava kiribû!
3 Gavên xwe ber bi van xerabeyên
ku nayên çêkirinê ve bibe! Neyar
her tiştên li cîhê pîroz xera kirin!
4 Neyarên te li cîhê civata te de
qûriyan, bi nîşanbûna serfiraziyê
alên xwe çikandin.
5 Ew, mîna yên bi tevrî ve, dike-
vin daristanek zehf geş e bûn.
6 Û bi teviran, bi valyoz hemû
nexşeyan şikandin.
7 Xaniyê te yî pîroz danîn ber
agir, bi erdê ve yek kirin û pîrozi-
ya wê xera kirin, xaniyê ku navê
te tê de dijî.
8 Wan di dilê xwe de gotin: Em
hemûyî biperçiqînin! Li welat,
hemû cîhên civata Xwedê xera
kirin.
9 Êdî em nîşanên xwe yî pîroz
nabînin; peyxamber jî tune bûn û
di nav me de tu kesek nizane ku
heta kengê.
10 Ya Xwedê, dê neyar heta ken-
gê xeberan ji te re bidin, neyarên
te, navê te biçûk bibînin?
11 Tu çima destê xwe şunda
vedikşîne? Destê xwe yî rast ji sîn-
ga xwe ve derxe, wan tune bike!
12 Lê belê ji derbasbûnê vî alî,
qiralê min tu yî, ya Xwedê, te li
rûyê erdê xelasiyê peyde kir.
13 Te bi hêza xwe, behrê qelişand;
serê cenawiran di avê de perçi-
qand.
14 Te seriyên Levyatan eciqand,
wê ji yên ku li çolê dijîn re kir
xwarin.
15 Te çavkaniyan, çeman piji-
qand, çemên her tim diherikiyan
jî ziwa kir.
16 Roj yê te ye, şev jî yê te, te
heyv û rojê bi cîh kir.
17 Te hemûya sînorên rûyê erdê
da xuyanî kirin; afirandêrê havîn
û zivistanê tu yî.
18 Di bîr bîne, ya XUDAN: Ne-
yarên te çawa kufrê li te dikirin.
Gelekî bê aqil navê te çawa biçûk
didîtin.
19 Canê qumriya xwe nede destê
cenawiran, heta bi hetayê jiyana
qûlên xwe yî belengaz ji bîr neke!
20 Peymana ku te çêkiriye, bide
ber çavê xwe! Ji ber ku, her
quncika[1] welat ya tarî, bi qulên
zordestan ve tijî bûye.
21 Bila belangaz, bi stuxwarî
şunda neyên vegerandin; bila fe-
qîr û belengaz, pesnahiyan ji navê
te re rêz bikin!
22 Rabe, ya Xwedê, doza xwe
biparêze! Di bîr bîne ku bêaqil
çawa di hemûya rojê de kufrê li
te dikirin!
23 Dengê neyarên xwe ji bîr
meke! Tep û repa yên li dijî te
serî hildane, çawa bêsekin bilind
dibe!

---
1 Goşe, qorzîk.

**Zebûr 75**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqama
Tune neke de. Zebûrek Qesîdê, ya
Asaf e.
Em şikiryê ji te re dikin, ya Xwe-
dê û ji te re şikiryê dikin, ji ber
ku navê te nêzîk e[1], nuwazeyên te
vêya xuyanî dikin.
2 Gava wexta ku bijartime bê, ez
ê bi rastiyê daraz bikim.
3 Dema rûyê erdê bi ser û binî
bibe, bi yên li ser wê: Ez ê beştên
wê bizexmînim. (Sela.)
4 Ji yên ku pesnê xwe didin re:
Êdî pesnên xwe nedin! gotim,
ji xeraban re: Serê xwe[2] ranekin
êdî!
5 Serê xwe ranekin! Ji jor ve nea-
xifin!
6 Ji ber ku darazî ne ji rojhilat, ne
ji rojava û ne jî ji çiyayên li çolê
ne, dizê.
7 Ji ber ku, dadger tenê Xwedê ye;
yekî kêm dike, yekî bilind dike.
8 Ji ber ku XUDAN tasekî tijî di
destê xwe de digire, xemra bi kef
û biharat tevî wê ye dirijîne: hemû
xerabê rûyê erdê, heta xirêfê wê
dimêjin û wê vedixwin.
9 Lê ez ê jî her tim vêya bidim
bihîstin, pesnê Xwedayê Aqûp
bi Zebûran ve bidim: 10 Û ez ê
hemû hêza xeraban bişkînim, lê
dê hêza yên rast jî bê bilind kirin.

**Zebûr 76**

1 Bona serekê mûsîkê. Bi sazên
têlî. Zebûrek Qesîdê, ya Asaf e.
Li Cihûdayê Xwedê tê zanîn, li
Îsraêlê navê wî bilind e.
2 Xaniyê wî li Şalemê[3] ye û cîhê
ku lê dijî li Siyonê ye.
3 Li wir tîrên bi agir şikestand,
mertal, şûr û çekên şer. (Sela.)
4 Tu bi şewle yî dibiriqe, ji çi-
yayên nêçîra wê zêde hîn jî bi
rewnaqî.
5 Egît rastî talanê hatin, ketin
xewa xwe û ûsa bû ku, yên herî
xwurtên wan jî nikarin destê xwe
tev bidin.
6 Ya Xwedayê Aqûp, dema tu pe-
kiya, hesp û siwar ketin xewa xwe
yî dawîn.
7 Tu yî, yê divê mirov jê bitirsin;
dema tu hêrs bibe, ma kî dikare li
hemberê te bisekine?
8 Te daraziya xwe ji ezmanan ve
têgîhand; rûyê erdê tirsiya û ket
bêdengiyê,
9 Ya Xwedê, dema te dest bi da-
razkirinê, dest bi xelas kirina
belengazên welat kir. (Sela.)
10 Heta xezeba mirovan jî pes-
nahiyê ji te re dike; tu, yên ku ji
xezeba te xelas bûne, li dora xwe
dicivînî.
11 Ji XUDAN, Xwedayê xwe
re qewlan pêşkêş bikin; qewlên

---

[1] Tu nêzîk î: Bi Îbranîtî, navê te nêzîk e.
[2] Serê xwe: Bi Îbranîtî qiloçên xwe (qiloç nîşana hêzê û xwurtiyê ye).
[3] Şalem: Yanê Orşelîm.

xwe bînin cîh. Xelatan pêşkêşî wî
bikin, yê ku hewceye mirov jê bi-
tirse, hemû kesên li dora wî!
12 Ew hilma serokan dibire, tirsê
dide qiralên rûyê erdê.

**Zebûr 77**

1 Bona serekê mûsîkê Yedûtûn.
Zebûra Asaf e. Ez bi dengê bilind
lava ji Xwedê re dikim û bona ku
min bibihîze diqêrim.
2 Min di roja xwe yî teng de berê
xwe da Xudan; şevê bêsekin des-
tên xwe vekirim û tu carî canê
min xemrevîniyê naxwaze.
3 Xwedê di bîr tînim û dinalim;
her ku difikirim, tengasî tê dilê
min. (Sela.)
4 Tu pêlûyên çavê min vekirî
dihêle; ez ji tengasiyê ve nikarim
biaxifim.
5 Rojên derbasbûyî, beriya salan
difikirim.
6 Ez şevê, qesîdeyên xwe di bîr
tînim û bi dilê xwe re diaxifim,
ez ê bi ziravî bipirsim: 7 Ma dê
Xudan heta bêdawîbûnê me red
bike? Ma tu xêra xwe carekî din
jî nadî xuya kirin?
8 Ma hezkirina wî heta bê-
dawîbûnê tune bû? Ma êdî gotina
wî derbas nabe?
9 Ma Xwedê li berketinê ji bîr ki-
riye? Ma hêrsê cîhê dilovaniya wî
girtiye? (Sela.)
10 Pişt re xwe bi xwe re: A
vay, derdê min ev e! gotim. Lê
belê, li salên destê rast yê Bilind
digerim.
11 Ez ê karên XUDAN di bîra
xwe de bînim; belê, nuwazeyên
wî yî di derbasbûnê de di bîr bî-
nim.
12 Û ez ê li ser kirinên wî kûr bifi-
kirim, bi balkêşî li ser hemû karên
wî bisekinim.
13 Ya Xwedê, rêya te pîroz e! Ma
kîjan îlah qasî Xwedê bilind e?
14 Xwedayê ku nuwazeyan
afirandiye, tu yî, te di nava gelan
de hêza xwe da xuya kirin.
15 Te bi hêza bazindê xwe gelê
xwe, lawên Aqûp û Ûsiv xelas
kir. (Sela.)
16 Dema av te dîtin; ya Xwedê,
dema av te dîtin; li hev ketin;
belê, balûpal lerizîn.
17 Ewran avên xwe vala kirin; ez-
manan dengên xwe dan bihîstin û
li her alî ve tîrên te firiyan.
18 Di bahozê de gurmîniya te hate
bihîstin, birûskan dinê ronî kirin;
erd kil bû û lerizî.
19 Te ji xwe re di behrê de û di
avên kûr de rê vekir; lê belê şopên
lingên te ne eşkere bûn.
20 Te bi destê Mûsa û Harûn, gelê
xwe mîna keriyekî ajot.

**Zebûr 78**

1 Maskîla Asaf e. Guh bide
Zagona min, ya gelê min; guh
bide gotinên ji devê min ve der-
dikevin!

2 Ez ê bi methelokan ve devê xwe
vekim, razên di derbasbûyînê de
ne bînim ziman.
3 Yên ku me bihîstine, yên ku em
dizanin û tiştên ku bapîrên me ji
me re gotine.
4 Em ê vana ji lawên te ve
veneşêrin; karên XUDAN, yên
liyaqî pesnahiyê ne, hêza wî û
nuwazeyên ku çêkiriye, bigehînin
nifşeya ku were.
5 Ji ber ku XUDAN şahdeyiyek
daxuyaniyî nîjada Aqûp kir û Za-
gonek danî Îsraêlê, bona ku vana
hînî zarokên xwe bikin; emir da
kalikên me.
6 Ûsa ku, bila nifşeya ku were,
zarokên nû biwelidin zanibin,
bila ew jî ji zarokê xwe re bi-
bêjin.
7 Û bila hêviya xwe bi Xwedê ve
girê bidin û kirinên Xwedê ji bîr
nekin û emirên wî bînin cîh.
8 Û bila mîna kalikên xwe ne-
bin nifşeyekî bi inyad û asê, dilê
wan bêqirar û ne dilsozê Xwedê
nebin.
9 Lawên Efrayîm, bi tîr û keva-
nan ve xemilî, roja şer pişta xwe
zivirandin.
10 Li gor peymana Xwedê neki-
rin û jiyana li gor Zagona wî red
kirin.
11 Û karên wî, ji bîr kirin û nuwa-
zeyên ku nîşanî wan daye.
12 Li Misirê, li herêma Soanê,
Xwedê nuwazeyan li pêşiya
bapîrên wan çêkiribû.
13 Bi qelişandina behrê, wan der-
bas kiribû û avê mîna dîwarekî li
ser pêlan sekinandibû.
14 Û rojê bi ewrekî û şevê jî bi
ronahiya agir ve rê nîşanî wan
dabû.
15 Li çolê zinaran qelişandibû û
mîna ku ji çavkaniyên bêbinî bi
têra xwe avê bi wan ve dabû ve-
xwarin.
16 Û ji zinarê çeman pijiqandibû
û av mîna çeman herikîbûn.
17 Lê belê wan li çolê serî li dijî
Bilindê Bilindan hildan û guneh
kirinê domandin.
18 Û bi xwestina xwarina ku
canên wan dixwaze, di dilê xwe
de Xwedê ceribandin.
19 Û bi gotina: Ma Xwedê dikare
li çolê sifrê ava bike? li dijî Xwe-
dê axifîn.
20 Binêre, dema li zinarê xist, avê
pejiqand û newal di ser ve çûn;
belê, lê dikare nan jî bide, an goşt
ji gelê xwe re peyda bike?
21 Ji ber vê yekê dema XUDAN
vêya bihîst, hêrs bû û li dijî Aqûp
agir barand[1] û li dijî Îsraêlê hêrsa
wî zêde bû.
22 Ji ber ku bi Xwedê ve bawer
nedibûn û bi xelaskeriya wî ewle
nedibûn.
23 Û dîsa jî wî li jor emir da
ewran, devê ezmanan vekir.

[1] Pê ve xist.

24 Û bona wan têr bike, mannê[1]
barand, dexla ezmanî da wan.
25 Her yekî, nanê milyaketan[2]
xwarin, bi têra xwe xwarinê ji
wan re şand.
26 Wî, bayê rojhilatê ji ezmanan
ve da û bi hêza xwe rê nîşanî bayê
başûrê da.
27 Û mîna tozê, goşt li ser serê
wan barand û qasî qûma behrê
civîk;
28 Û ew avêtin nav artêşgeha
wan, dora cîhê ku lê qonax dane.
29 Û bi vî awayî xwarin û gellekî
têr bûn û xwestekên wan da wan.
30 Lê belê hîn ew têrî xwestekên
xwe nebûbûn, hîn xwarin di devê
wan de bû,
31 Hêrsa Xwedê bi ser wan ve
sor bû û yên herî xwurtên wan
kuşt û egîdên Îsraêlê li erdê ve
raxistin.
32 Lê dîsa jî guneh kirina xwe do-
mandin û baweriya xwe bi nuwa-
zeyên wî neanîn.
33 Bo vêya wî rojên wan di nava
valahiyê de û salên wan jî di nava
tirsehêzê de qedand.
34 Her ku Xwedê wan dikuşt,
wan berê xwe didan wî û bi xwes-
tek, dest bi gerîna wî dikirin.
35 Û di bîr dianîn ku Xwedê zi-
narê wan e û Xwedayê bilind xe-
laskerê wan e.
36 Lê belê bi devên xwe çaplûsi-
yê li wî dikirin û bi zimanên xwe
derewan dikirin.
37 Ji dil ne dilsozê wî bûn û bi
peymana wî ve girêdayî neman.
38 Dîsa jî ew dilovan bû, li gu-
nehên wan diborand û wan tune
nedikir û pirr caran bi hêrsa xwe
ve digirt û hemûya xezeba xwe
nîşan neda.
39 Û mirovbûna wan di bîra xwe
de anî, mîna bayekî derbas dibe û
diçe, şunda venagere.
40 Li çolê çend cara serî li wî raki-
rin, li cîhê tenha wî xeyidandin!
41 Û bi caran Xwedê ceribandin û
Pîrozê Îsraêlê êşandin.
42 Destê wî yî bi hêz, di bîra xwe
de neanîn, roja ku wan ji neyaran
ve xelas kiriye,
43 Nîşanên ku li Misirê daye
xuya kirin û karên ecêbmayî yên
li herêma Soanê çêkiriye:
44 Çemên Misirê wergerand
xwînê, nikarîbûn ku ji avên wê
vexwarana.
45 Kermêşên ku şandibû gel xwa-
rin û beqên ku şandibû welêt tune
kirin.
46 Û zadên wan da kurman û dex-
la keda wan da kuliyan.
47 Bi zîpikan li rezên wan xist
û bi xunavê li darên wanî tuyê
xist.

---

1 Manna: Xwarina ku Xwedê, bona Îsraêliyên ji Misirê ve derketine têr bike, ji ezmanan ve şandiye (Binêr. 2.Mûsa 16:13-16).
2 Milyaketan, an ji: Xwurtan (bihêzan).

48 Û heywanên wan da zîpika û
keriyê wan jî da birûskê.
49 Wî, agirê hêrsa xwe barand
ser wan, kerb û xişm û tengasî û
artêşek milyaketên xerabiyê
bi ser wan ve şand.
50 Rê da hêrsa xwe, canên wan ji
mirinê ve neparast û wan da nav
lepên nexweşiya perok.
51 Û hemûyên li Misirê pêşiyê
welidîne, di çadirên Ham de li
hemû zarokên pêşîn xist.
52 Û gelê xwe mîna mîhan bir û li
çolê wan mîna keriyekî ajot.
53 Û di nava ewledariyê de rê nîşanî
wan da, netirsiyan; lê belê behrê
yên neyarên wan in, daqurtand.
54 Û bi vî awayî wan anî sînora
axên xwe yî pîroz, li herêma çi-
yayiya ku bi destê xwe yî rast qe-
zenc kiribû.
55 Û ji pêşiya wan netewan qe-
wirand û bi mêrasî erdên wan, di
nava eşîrên Îsraêlê de par kir
û gelê xwe di xaniyên wan de bi
cîh kir.
56 Lê belê wan Xwedayê bilind
ceribandin û li dijî wî serî hildan û
li gor şahdeyiyên wî nekirin.
57 Û çivokiyê kirin û mîna bapîrên
xwe îxanetê kirin; mîna kevanek
ne ewlekar e, xerabe derketin.
58 Û li cîhê ku bi pûtan ve peris-
tin, wî bi hêrs kirin û bi pûtên xwe
yî kolîn wî dexisandin.
59 Dema Xwedê vana bihîst, pirr
bi hêrs bû û bi tûmî Îsraêlê red kir.
60 Û çadira xwe yî di nava miro-
van de ava kiriye û mala xwe yî li
Şîloyê terikand.
61 Û qudreta xwe da destê dîli-
tiyê û Rewnaqiya xwe da destê
neyar[1].
62 Û gelê xwe ber bi şûr ve ajot û
hêrsa xwe ji gelê xwe ve derxist.
63 Agir xortên wî daqurtandin û
êdî ûsa bû ku, stranên dawetê ji
keçikên wî re nedihat gotin.
64 Kahînên wî di bin şûr de mirin
û jinebiyên wî êdî nikarîbûn bigi-
riyana.
65 Wê demê, Xudan mîna ku ji
xewê ve hişyar bibe, mîna egîdek
ji tevizandina xemrê ve hişyar
bibe bû.
66 Û wî li neyarên xwe xist, şunda
pijiqand; şermezariya bêdawî da
wan.
67 Û wî nîjada Ûsiv red kir û eşîra
Efrayîm jî nebijart.
68 Lê wî Eşîra Cihûda û Çiyayê
Siyonê yê ku ji wê hez kir bijart.
69 Û cîhên wê yî pîroz mîna
şaxan, mîna rûyê erdê ya ku bona
bêdawîbûnê damezirandiye kir.
70 Û wî, qûlê xwe Dawid bijart û
ew ji hewşa mîhan ve girt.
71 Gelê wî bona Aqûp, gelê wî,
mêrasa wî bona ku Îsraêlê bajo,
wî di paş berxikan de anî.

---

[1] Gotinên qudret û rewnaqî, yên ku di vê ayetê de derbas dibin, tên mana Sindoqa Peymanê.

72 Û bi vî awayî, Dawid bi duris-
tiya dil, şivantiyê ji wan re kir û
bi destên xwe yî bihuner rê nîşanî
wan da.

**Zebûr 79**

1 Zebûra Asaf e. Ya Xwedê, ne-
tewan êrîşî welatê te kirin, Pe-
restgeha te yî pîroz gemarî kirin;
Orşelîmê kirin mîna xirba kevi-
ran!
2 Cesedên qûlên te, bi xwarinî
dan civîkên ezmanan, goştê qûlên
te yî dilsoz dan heywanên hov.
3 Xwîna wan mîna avê herikan-
din, li dora Orşelîmê. Û kesekî
wan binax bike nîne.
4 Em ji cîranên xwe re bûn rûreşî,
ji yên li dora me re jî, bûn qerf û
pêlîstik!
5 Dê heta çi wextî, ya XUDAN?
Ma dê heta bêdawîbûnê bidome
hêrsa te, dexesiya te yî mîna agir
dişewite?
6 Hêrsa xwe li ser neteweyên ku
te nas nakin û li ser welatên ku
navê te di bîr nîn in birijîne!
7 Ji ber ku wan, nîjada Aqûp da-
qurtandin û welatê wî bi erdê ve
kirin yek.
8 Fesadiyên bapîrên me li dijî me
di bîr ve neyne: bila dilovaniyên
te zû pêşwaziyê li me bikin!
Ji ber ku em gelleki bi nizm bûn!
9 Di oxra navê xwe yî bilind de
alîkariyê bi me re bike, ya Xwe-
dayê me xelas kiriye û di oxra
navê xwe de me xelas bike, li gu-
nehên me biborîne!
10 Çima bila netewe bi gotina:
Kanê Xwedayê wan? biaxifin,
bila zanibin ku tuyê tola xwîna
qûlên xwe, ya hatiye rijandin
bigire, em vêya bi çavên xwe bi-
bînin!
11 Bila nalîna girtiyan bigihêje
qatê te; bi hêza xwe yî mezin, yên
bûne zarokên mirinê biparêze!
12 Û heqaretên ku cîranên me li te
kirine, bi heft qatî şunda vegerîne
sînga wan, ya Xudan!
13 Em ê ûsa bibin, gelê te, mîhên
mêrga te, em ê heta bêdawîbûnê
şikiryê ji te re bikin, ji tûmiya
nifşeyan re pesnahiyên te bêjin.

**Zebûr 80**

1 Bona serekê mûsîkê. Di miqa-
ma Peymana Sosinan de. Zebûra
Asaf e. Guh bide, ya şivanê Îs-
raêlê! Ya yê ku Ûsiv mîna keri-
yan ajotiye, yê di nava Kerûbiyan
de text ava kiriye, ronahiya xwe
bide!
2 Li ber Efrayîm û Benyamîn û
Manaşşe hêza xwe hişyar bike û
were, me xelas bike!
3 Me bigehîne rewşa me yî kevin,
ya Xwedê! Bi şewla wecê xwe ro-
nahî bike, em xelas bibin!
4 Ya XUDAN, Xwedayê serwerê
hemû hêzan! Tuyê heta kengê
agirê hêrsa xwe bipejiqînî duayên
gelê xwe?

5 Te nanê hêsirên çava da wan û
bi olçeka mezin hêsirê çavan bi
wan re da vexwarin.
6 Te me ji cîranê me re kir sedema
şer kirinê û neyarên me, henekê
xwe bi me dikin.
7 Me bigihîne rewşa me yî kevin,
ya Xwedayê serwerê hemû hêzan
û bi şewla ronahiya xwe ronî bike,
em xelas bibin!
8 Te ji Misirê darekî mêwê anî,
netewan qewirand û wê çikand.
9 Te bona wê axê amade kir û reh
berda, belavî hemû welatî bû.
10 Siya wê çiyayan û guliyên wê,
darên serwiyên Xwedê, mezin
girtin.
11 Guliyên xwe heta behrê û ajên
xwe heta çem berda.
12 Te çima dîwarên rez xera kir?
Ûsa ku, her kesê ji rê ve derbas
dibin, tiriyê wê jê dikin.
13 Berazên daristanê wê peritandin
û heywanên hov bi wê xwedî dibin.
14 Ya Xwedayê serwerê hemû
hêzan, çi dibe; şunda vegere me!
Ji ezmanan ve binêre û bibîne û bi
vê mêwê ve eleqedar bibe.
15 Û bi vê aja ku destê te yî rastê
çikandiye ve eleqedar bibe û bi
lawê ku te ji xwe re bijartiye!
16 Mêwa te hatiye jê kirin,
şewitandin; li ber nêrînên te ew
tune dibin!
17 Bila destê te, li ser zilamê ku
milê te yî rast e, li ser mirovê ku
te bona xwe bijartiye be!
18 Wê çaxê em tu carî ji te naqe-
tin; dê me bivejîne û em navê te
di bîr bînin!
19 Ya XUDAN, ya Xwedayê
serwerê hemû hêzan! me bigehî-
ne rewşa me yî kevin, bi şewla
wecê xwe ronî bike ku, em xelas
bibin!

**Zebûr 81**

1 Bona serekê mûsîkê. Li ser
Gîtîtê, Zebûra Asaf e. Kêfxweşiya
xwe, ji bo Xwedayê ku hêza me ye
bînin ziman! Qêrînên kêfxweşiyê
ji Xwedayê Aqûp re bavêjin!
2 Dest bi lêxistina sazan bikin, li
tefê xin, lîra deng şêrîn û çenkê
biçingînin!
3 Di heyva nû de, di heyva pazne
de, di roja me yî cejnê de, li bori-
yê bixin!
4 Ji ber ku ev bona Îsraêlê Zago-
nek e, Sereta Xwedayê Aqûp e.
5 Dema ew bi ser Misirê ve
meşiya, vê hoya ji nîjada Ûsiv re
danî. Li wir, dengekî ku nas na-
kim bihîstim: 6 Barê li pişta wî
rakirim, destên wî ji zembîlê ve
xelas bûn, digot.
7 Dema tu ket tengasiyê, te bangî
min kir û te xelas kirim, paşî gur-
mîniya ezmanan bersivê dam te,
di avên Merîba de, te ceribandim.
(Sela.)
8 Guhdarî bike, ya gelê min û ez
te îkaz dikim; ya Îsraêl, xwezîka
tu min guhdarî bike!

9 Bila di nav te de îlahek biyan
tune be û peristinê ji îlahekî biyan
re meke!
10 Yê te ji Misirê ve derxistiye,
Xwedayê te, XUDAN ez im; devê
xwe baş veke, ez tijî bikim!
11 Lê belê gelê min, dengê min
guhdarî nekirin û Îsraêl nexwest
ku histu ji min re xwar bike. 12
Û min jî wan bi inyada dilê wan
ve berda, da ku, bila li gor şîretên
xwe bimeşin.
13 Xwezîka gelê min, min guh-
darî bikira, Îsraêl di rêyên min de
bimeşiya!
14 Min ê hema dijminên wan li
erdê ve raxista û dest ji neyarên
wan ve rakirima!
15 Yên ji XUDAN dikerihin,
dê histu ji wî re xwar bikirana û
wexta wan, ûsa heta bêdawîbûnê
didomiya.
16 Û min wî bi genimên herî
qenc ve xwedî dikir û te, bi hin-
guva ku ji zinaran ve diherike têr
dikirim!

**Zebûr 82**

1 Zebûra Asaf e. Xwedê cîhê xwe
di sazûmana xwedanî[1] de girt,
daxuyaniya daraziya xwe dike di
nava îlahan de: 2 Hûn ê heta ken-
gê qirara neheq bidin û hurmetê
nîşanî xeraban didin? (Sela.)
3 Doza lawazan û sêwiyan bi-
parêzin; li mafê xizan û belenga-
zan bigerin!
4 Yê lawaz û belengaz xelas
bikin, wan ji destê xeraban ve
bistînin!
5 Nizanin û fêhm nakin, di tariyê
de digerin: Bingehên rûyê erdê
dilerizin.
6 Gotim ku: Hûn îlah in. Hûn
hemû lawê Bilindê Bilinda nin!
7 Lê dîsa jî hûn ê mîna mirovan
bimirin û mîna serokekî rêzî bike-
vin!
8 Rabe, ya Xwedê, rûyê erdê da-
raz bike! Ji ber ku hemû netewe
mêrasa te ne!

**Zebûr 83**

1 Qesîde. Zebûra Asaf e. Ya Xwe-
dê, bêdeng nebe, bêdeng û bêtev-
ger nemîne, ya Xwedê!
2 Ji ber ku binêre, neyarên te tev-
liheviyê derdixin û yên ku ji te di-
kerihin serî hildidin.
3 Li dijî gelê te, li pê fenekiyê ne,
dek û dolaban li mirovên ku te
wan parastine re dikin.
4 Ew dibêjin: Werin, em koka vê
netewê bikolin, bila carekî din
navê Îsraêl di bîr neyê!
5 Ji ber ku, hemûyan yek gotinî
kirine, desîsê çê dikin. Li dijî te
peymanekê danîn[2]:

---

1 Di sazûmana xwedanî de, an jî: Di civaka daraz-kiran de.

2 An jî: Çê kirin.

6 Gelê Edomî û Simaîlî, Moab û
Hacerî,
7 Gebale û Amon û Amalek,
Filistîn û bi hemû gelê Sûrê.
8 Asûr jî beşdarî wan bû; hêz dan
Lawên Lût. (Sela.)
9 Tiştên ku te bi Midyanê ve, di
newala Kîşonê de ji Sîsera re û ji
Yawîn re kiriye bike.
10 Ew li Eyn-Dorê ve tune bûn,
bona axê bûn sergîn!
11 Tiştên ku te bi Oreb û Zêeb ve
kiriye ji biesilên wan ve, yên ku
te bi Zebah û Salmûna ve kiriye ji
begê wan ve bike!
12 Ji ber ku wan: Werin em li
mêrgên Xwedê ve xwedî derke-
vin! gotibûn.
13 Ya Xwedayê min, wan bike
mîna toza li ber bahozê ve diçe,
mîna qirşika kayê, ya ku li ber
bayê ve diçe!
14 Mîna şewita daristanan û mîna
agirê çiyayan pê dixe.
15 Bi bahoza xwe ve bera bide
û bi bagêjê xwe, wan bixe
toqînê!
16 Ser çavên wan bi şermezariyê
ve bigire, ku bila berê xwe bidin
navê te, ya XUDAN!
17 Bila heta bêdawîbûnê di nava
şermezarî û tirsehêzê de bimînin
û bi rezîlbûnê ve tune bibin.
18 Û bila fêhm bikin ku, tenê
tu, ku navê te XUDAN e: yê
herî mezin, yê serwerê rûyê
erdê yî!

**Zebûr 84**

1 Bona serekê mûsîkê. Li ser
Gîtîtê, Zebûra lawên Korah e. Ya
XUDANê serwerê hemû hêzan,
xaniyên te çiqas xweşik in!
2 Canê min bêriya hewşên te dike,
hundirê min dikişîne, ji hewşên
XUDAN; dilê min û hemû hebû-
na min, ji te re, ji Xwedayê zindî
re, bi kêfxweşî diqêre.
3 Heta civîkan jî hêlînek û hecî-
reşk cîhekî çêlikên xwe lê deyne
dîtin, li cem pêşkêşîgehên te, ya
XUDANê serwerê hemû hêzan,
Qiralê min û Xwedayê min!
4 Xwezî li yên ku li mala te rû-
dinin, ew her tim pesnê te didin!
(Sela.)
5 Xwezî li mirovê ku hêza xwe
ji te distîne! Hişê wî her tim li
serîdanka Siyonê ye.
6 Dema ji newala girînê ve derbas
dibin, wir dikin mîna serê kani-
yan, belê, baranên biharê li wir di
bereketê de dihêle.
7 Her ku dihere xwurt dibin; li Si-
yonê derdikevin hizûra Xwedê.
8 Ya XUDAN, Xwedayê ser-
werê hemû hêzan, dua min guh-
darî bike; guh bide, ya Xwedayê
Aqûp! (Sela.)
9 Ya Xwedayê ku mertala me
ye: binêre û wecê Mesîhê xwe
bibîne!
10 Rojeka di hewşên te de, ji he-
zar rojên derekî din qenctir e; heta
ku ez di çadira xeraban de bijîm,

ez li şêmûga xaniyê Xwedê de sekinê çêtir dibînim!
11 Ji ber ku XUDAN, Xwedê roj e û mertal e; xêr û bilindahiyê XUDAN peyda dike, tu qenciyê ji yên bi duristî dijîn ve naparêze.
12 Ya XUDANê serwerê hemû hêzan, xwezî li wî mirovê ku bi te bawer e!

**Zebûr 85**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra lawên Korah e. Ya XUDAN, tu ji welatê xwe dilxweş bû, te sirgûniya Aqûp şunda vegerand.
2 Te li sûcên gelê xwe bihurand, hemû gunehên wan nuxumand. (Sela.)
3 Te hemûya xezeba xwe şunda kişand, ji hêrsa xwe yî sor ve derbas bûyî.
4 Ya Xwedayê ku me xelas kiriye, me bîne rewşa me yî kevin û hêrsa xwe yî li dijî me bisekinîne!
5 Ma tuyê heta bêdawîbûnê bi me re hêrs bibî? Tuyê hêrsa xwe ji nifşeya heta nifşeyan bidomînî?
6 Bona ku gelê te di te de kêfxweşiyê bibîne, ma tuyê ji nû ve jiyanê nede me?
7 Ya XUDAN, xêra xwe nîşanî me bide û xelasiya xwe li me bibexşîne!
8 Ez ê guh bidim gotina ku XUDAN, Xwedê bibêje; ji ber ku dê soza dilxweşiyê bide gelê xwe û qûlên xwe yî dilsoz, bes ku, bila carekî din bêaqiltiyê mekin!
9 Belê, ew li ser xelas kirina yên ku ji wî ditirsin e, bona ku rewnaqiya wî li welatê me bijî.
10 Xêr û dilsozî gihîştin hev, rastî û dilxweşî hev û din ramûsandin.
11 Dê dilsozî ji erdê ve şîn bibe[1] û rastî ji ezmanan ve binêre.
12 Û XUDAN, yê qenc çi be, dê wê bide û dê ji zeviyên me dexl bipejiqin.
13 Dê rastî li pêşiya wî bimeşe û bona gavên wî rê çê bike.

**Zebûr 86**

1 Duaya Dawid e. Guh bide, ya XUDAN, bersivê bide min! Ji ber ku ez xizan û belengaz im.
2 Canê min biparêze, ji ber ku ez dilsozê te me. Ya Xwedê, qûlê te yî bi te ewle ye xelas bike!
3 Bila heyfa te li min bê, ya Xudan! Ji ber ku, ez di temamiya rojê de bangî te dikim.
4 Canê qûlê xwe kêfxweş bike, ya Xudan! Ji ber ku, ez canê xwe bona te bilind dikim.
5 Ji ber ku, tu qenc û efûkir e, ya Xudan û tu xêra zêdeyî nîşanî hemûyên ku bangî te dikin didî.
6 Guh bide duaya min, ya XUDAN û bala xwe bide dengê lavayê min!
7 Ez di roja xwe yî teng de bangî te dikim, ji ber ku tu bersivê dide min.

---
1 Derkeve.

8 Ya Xudan, di nava îlahan
de yekî wek te nîne û karên te
bêmînak in.
9 Dê hemû neteweyên ku te
afirandiye werin û ji te re biperis-
tin, ya Xudan,
û dê navê te bilindtir bikin!
10 Ji ber ku tu bilindî û nuwaze-
yan diafirînî, Xwedê tu yî, tenê tu!
11 Ya XUDAN, rêya xwe hînî min
bike: Ez li gor rastiya te bimeşim;
bona ku ji navê te bitirsim, dilê
min bi biryar bike!
12 Ya Xudan, Xwedayê min,
bi hemû dilê xwe şikiryê ji te re
bikim û navê te heta bêdawîbûnê
bilindtir bikim.
13 Ji ber ku xêra te yî ji min re
mezin e û te canê min ji kûraniya
warê miriyan ve xelas kir.
14 Ya Xwedê! Yên kanc êrîşî
min dikin û keriyê zordestan, yên
guh nadin te, dixwazin canê min
bistînin.
15 Lê belê tu, ya Xudan, tu Xwe-
dayek dilovan, xêrê dikî, zû hêrs
nabî, xêr û dilsoziya te zêde ye.
16 Berî bide min, bila heyfa te li
min bê! Hêza xwe bide qûlê xwe û
lawê xizmetkerê xwe xelas bike!
17 Nîşanekî qenciya xwe rê min
bide; da ku, yên ji min dikerihin
bibînin û bişermin; ji ber ku te, ya
XUDAN, te alîkariyê bi min re
kir û xemrevîniyê li min kir.

**Zebûr 87**

1 Zebûrek Qesîdê, ya lawên Ko-
rah e. Bingeha wê li ser çiyayên
pîroziyê ye.
2 XUDAN ji deriyên Siyonê, ji
hemûya xaniyên Aqûp ve zêdetir
hez dike.
3 Ya bajarê Xwedê, bona te çiqas
gotinên bilind tê gotin: (Sela.)
4 Ez ê di nava kesên ku min di-
nasin de, Rehab[1] û Babîlê di bîr
bînim, Filistîn, Sûrê û Hebeşê jî:
Ev jî li wir welidî.
5 Û dê bona Siyonê: Ev zilam
û ew zilam li wir welidîne,
bête gotin û Yê ku Bilind e,
dê bona xwe wî bide zexi-
mandin[2].
6 Dema XUDAN gelan qeyd dike,
dê bi nivîsa: Ev jî li wê bûyiye bi-
nivîse. (Sela.)
7 Û dê xwendevan û bilûrvanan
bi reqsê: Hemû çavkaniyên min
di te de ne! bibêjin.

**Zebûr 88**

1 Zebûrek Qesîdê, ya lawên
Korah e. Bona serekê mûsîkê.
Di miqama Mahalat-Leanot de.
Maskîla Heymanê Ezrahî e. Ya
XUDAN, Xwedayê xelasiya
min! Ez bi şev û roj li ber te ge-
riyam.
2 Bila dua min bigihêje te! Guh
bide lavaya min!

[1] Rehab: Misirê dide nişan kirin.

[2] Bizexmîne, an jî: Bêlenizin bike.

3 Ji ber ku, ji tengasiyê ve canê
min têr bû û jiyana min gîhaşt
warê miriyan.
4 Ez di nava yên ku daketine warê
miriyan de têm hesibandin, ez
bûm mîna mirovekî bêhêz e!
5 Ez bûme mîna cesedên ku hatine
avêtinî nava miriyan, yên ku êdî tu
di bîra xwe de nîne û ji destê te ve
veqetiya ye, di qebran de radikevin.
6 Te min avêt binya kortalê, tari-
yan, kûriyan.
7 Hêrsa te daket ser min û te bi
hêrsa xwe yî pêl û pêl min eci-
qand. (Sela.)
8 Te merivên min, ji min ve dûr
xist, min di çavên wan de erjeng
da xuya kirin; ez girtî mam û ni-
karim derkevim.
9 Ji kesera min, ronîka çavên min
vedimirin; her roj li ber te dige-
rim, ya XUDAN, destên xwe ji te
re vedikim.
10 Ma tuyê nuwazeyên xwe nîşanî
miriyan bidî? Ma dê mirî rabin û
pesnahiya te bidin? (Sela.)
11 Ma xêra te di qebrê de dilsoziya te
di warê têkçûnê de dê bê bihîstin?
12 Ma di tariyan de nuwazeyên te
û di warê bîrkirinê de rastiya te dê
bê zanîn?
13 Lê belê ez, ya XUDAN, te
bangî alîkariya xwe dikim û dua
minî sibehê digihêje te.
14 Ya XUDAN, çima tu canê min
ji xwe ve davêjî? Çima wecê xwe
ji min vedişêrî?
15 Ez zebûn im û ji ciwantiya
xwe de her tim bi mirinê ve ra-
westî me, toqînên te kişandim, şaş
û metal mam.
16 Xezeba te yî dijwar, ji ser min
ve derbas bû; tirsên te min tune
kirin.
17 Di hemûya rojê de mîna avê
dora min girtin; hemûyan bi hev
re dora min girtin.
18 Te hezkir û heval ji min ve dûr
xist, yê ku dinasim jî tarî ne.

**Zebûr 89**

1 Maskîla Eytanê Ezrahî e. Ez ê pes-
na xêra XUDAN, heta bêdawîbûnê
bi murxan ve bidim, dilsoziya te
bigihînim hemû nifşeyan.
2 Ji ber ku gotim: Xêr heta bê-
dawîbûnê li ser pêlan disekine;
tu dilsoziya xwe, mîna ezmanan
abadîn bihêle.
3 Te got ku: Min bi zilamê ku bi-
jartime re peymanê çê kiriye, bi vî
awayî sondê ji qûlê xwe Dawid re
xwarim: 4 Ez ê nîjada te heta bê-
dawîbûnê bidim domandin û tex-
ta te di hemûya nifşeyan de bidim
domandinê. (Sela.)
5 Ya XUDAN, ezman pesnahiya
nuwazeyên te û di civaka pîrozan
de pesnê dilsoziya te tê dayîn.
6 Ji ber ku, di ezmanan de kî bi
XUDAN re şirîk tê danîn? Di nava
afirên îlahî de kî mîna XUDAN e?
7 Di nav civaka pîrozan de, Xwe-
dê tirsekî mezin dide bihîstin û ji

hemûyên ku li dora wî ne, bilind
û tirsehêz e.
8 Ya XUDAN, Xwedayê serwerê
hemû hêzan, ma yekî qasî te xwurt
heye, ya XUDAN? Û dilsoziya te,
dora te digire.
9 Tu li ser behrên har serweriyê
dajo û her ku şepêl radibin, wan
aş dikî.
10 Te Rehab, mîna ku berateyan
bieciqîne, perçiqand; bi baskên
xwe yî xwurt ve neyarên xwe be-
lav kir.
11 Ezman yê te ne û rûyê erdê jî
yê te; te bingeha dinê û heçî tiştên
li hundirê wê ne ava kir.
12 Te bakur û başûr afirand; çiya-
yên Tavor û Hermon, kêfxweşi-
yên xwe ji navê te re tînin ziman.
13 Baskê te bihêz e, destê te bi
qudret, destê te yî rast bilind e.
14 Texta te li ser dadî û rastiyê ve
ava kirî; xêr û dilsozî di pêşiya te
de diçin.
15 Xwezî li gelê zanin ku qêrînên
dilşayiyê bavêjin, ya XUDAN!
Di ronahiya wecê te de dimeşin.
16 Di temamiya rojê de, bi navê
te kêfxweş dibin û bi rastiya te ve
bilind dibin.
17 Ji ber ku tu hêz û bilindahiya
wan î û bi saya xêra te hêza me
zêde dibe.
18 Ji ber ku XUDAN, mertala me
ye û Pîrozê Îsraêlê qiralê me ye.
19 Te di derbasiyê de bi navdîti-
ya xewn û xeyalekî ji qûlên xwe
yî dilsoz re ûsa got: Bûm alîkarê
egîdekî, di nava gel de ciwanekî
bilindtir kirim.
20 Qûlê xwe Dawid dîtim, bi rûnê
xwe yî pîroz, wî mesh kirim.
21 Dê destê min ji wî re bibe alî-
kar û baskê min hêzê bide wî.
22 Dê neyar nikaribe xeracê ji wî
bistîne[1] û dê xerab nikaribin wî
biçeciqînin.
23 Ez ê neyarên wî, li ber wî
bişikînim û ez ê li yên ku ji wî di-
kerihin bixim.
24 Û dê dilsoziya min û xêra min
bibin piştgirên wî û dê bi navê
min hêza wî bilind bibe.
25 Û ez ê destê wî, li ser behran
û destê wî yê rastê li ser çeman
serwer bikim.
26 Dê bi gotina: Bavê min tu yî
bangî min bike, Xwedayê min,
zinara xelasiya min.
27 Ez ê jî wî bikim lawê xwe yî
pêşîn, bikim herî bilindê qiralên
dinê.
28 Ez ê heta bêdawîbûnê xêra xwe
nîşanî wî bidim û peymana ku min
bi wî re kiriye, tu carî dê xera nebe.
29 Û ez ê nîjada wî heta bê-
dawîbûnê û texta wî, heta ku ez-
man bisekine bidomînim.
30 Ger lawên wî ji Zagona min bi-
qetin û li gor sereteyên min nejîn;

[1] Dê neyar nikaribe wî bi xeracê ve girê bide; an jî: Nikare bixapîne.

31 Ger qaîdeyên min xera bikin û
li pêy emirên min neçin,
32 Ez ê serîhildanên wan bi darê
ve û sûcên wan jî bi lêxistinê ve bi
ceza bikim.
33 Lê belê ez dev ji xêra xwe
bernadim û pişta xwe ji dilsoziya
xwe re nazivirînim.
34 Ez peymana xwe xera nakim
û gotina ku ji devê min derketiye
naguherînim.
35 Carekê li ser pîroziya xwe
sond xwarim: Derewê ji Dawid re
nabêjim!
36 Dê nîjada wî heta bêdawîbûnê
bidome û texta wî, mîna rojekê li
ber min bisekine.
37 Dê li ezmanan, mîna heyva
şahdeyek ewlekar e, heta bê-
dawîbûnê bisekine. (Sela.)
38 Lê belê te red kir û pişta xwe
zivirand û zehf bi hêrs bû, ji yê ku
te mesh kiriye re.
39 Te dev ji peymana ku bi
qûlê xwe re çêkiriye berda, te
taca wî avêt nav toz û axê û ge-
marî kir.
40 Te hemû bircên wî xera kir, ke-
lehên wî wêran kir.
41 Heçî kesên ku ji rê ve derbas
dibûn wê talan kirin, ji cîranê xwe
re bû rûreşî.
42 Te destên neyarên wî yî rast bi
ser wî ve rakir, hemû dijminên wî
kêfxweş kir.
43 Te devê şûrê wî da aliyekî din
û di şer de tu nebû piştgirê wî.
44 Te dawiya rewnaqiya wî anî û
textê wî li erdê ve xist.
45 Te rojên ciwaniya wî kêm kir,
wî bi şermezariyê ve xeniqand.
(Sela.)
46 Ka heta çi wextî, ya XUDAN?
ma tuyê heta bêdawîbûnê xwe
veşêre? Dê heta kengê hêrsa te
ûsa mîna agir bişewite?
47 Temena min çiqas zû derbas
dibe, di bîra xwe de bîne, te lawê
mirov çiqas vala afirandiye!
48 Ma miroveki jiyaye be û mi-
rinê nas nekiribe heye? Yekî canê
xwe ji warê miriyan ve xelas kiri-
ye? (Sela.)
49 Ya Xudan, xêrên te yî kevin li
ku ne? Ew dilsoziya te, ya ku te ji
Dawid re sond xwaribû[1]!
50 Ya Xudan, riswatiya qûlên
xwe di bîr bîne; ez gazinca hemû
neteweyên xwurt di sînga xwe de
dikişînim.
51 Heqareta neyarên te, ya XU-
DAN, heqaretên li gavên yê ku te
mesh kiriye davêje dikin!
52 Bila heta bêdawîbûnê pesnahî ji
XUDAN re be! Amîn: belê, Amîn!

PIRTÛKA ÇAREMÎN (4)

**Zebûr 90**

1 Duaya Mûsayê zilamê Xwedê
ye. Ya Xudan, tu ji me re bû sitar-
geh, di hemûya nifşeyan de!

1 Ya bona ku şani Dawid bida, te sond xwaribû!

2 Berî bûyîna çiyayan û hîn berî
afirandina erdê û dinê, belê, ji
bêberîbûnê heta bêdawîbûnê
Xwedê tu yî.
3 Tu mirovan vedigerînî axê û bi
gotina: Ya lawên mirov, vegerin
axê!
4 Ji ber ku di çavên te de hezar sal,
rojekî derbas bûyî, mîna dohîn û
mîna nobedariyekî şevê ye.
5 Tu mirovan mîna xewnekî paqij
dikî û dimalî, mîna gîhayên si-
behê derdikeve.
6 Sibehê şiv dide û dirêj dibe;
êvarê diçilmise û hişk dibe.
7 Ji ber ku em, ji hêrsa te duhulin
û diqedin û ji xeyida te dikevin
tirsehêzê.
8 Te sûcên me li ber xwe danî, gu-
nehên me yî dizîka derxist ronahi-
ya wecê xwe.
9 Ji ber ku hemû rojên me di xe-
zeba te de dibuhurin; em salên
xwe mîna hilmekê diqedînin.
10 Temena me heftê sal didome û
qet nebe, heyştê. ew jî em bi ten-
duristî bin û salên herî qenc jî bi
zehmet û keserê ve derbas dibin û
zû diqedin, em difirin û diçin.
11 Kî dizane hêza xezeba te? Ji
ber ku hêrsa te, qasî tirsa ku mirov
ji te ditirsin mezin e.
12 Bo vêya jimartina rojên me
hînî me bike ku. em dilekî bizani-
yar bi dest ve bixin!
13 Dîsa dev jê berde, ya XUDAN!
Dê hêrsa te heta çi wextî bidome?
Bila heyfa te li qûlên te bê!
14 Sibehê me bi xêra xwe ve têr
bike, em di hemûya temena xwe
de bi kêfxweşiyê ve biqêrin.
15 Ger te me çend rojê xistibe
tengasiyê, çiqas salî jî xemê dabe,
ewqasî me kêfxweş bike!
16 Bila kirinên te ji qûlên te re û
rewnaqiya te bi zarokên wan ve
bê xuya kirin!
17 Bila Xwedayê me Xudan ji me
ve dilxweş bimîne! Û keda destê
me li valahiyê dernexe. Belê, keda
destê me li valahiyê dernexe!

**Zebûr 91**

1 Yê li sitargeha Bilindê Bilindan
rûdine, di siya yê ku hêza wî têra
her tiştî dike de disitire.
2 Ew sitargeha min. keleha min e;
dibêjim bona XUDAN, Xwedayê
min e. ez bi wî ewle me!
3 Ji ber ku ew te ji dafika nêçîrvan û
ji nexweşiya mirinê ve xelas dike.
4 Te digire bin bazikên xwe û tu
xwe di bin wan de disitirîne. Dilso-
ziya wî dibe mertal û parêzgeha te.
5 Tu ne ji tirsehêza şevê ve ditirsî,
ne ji tîra ku bi rojê difire.
6 Ne ji nexweşiya mirinî ya di
tariyê de digere. ne jî buhartina
nîvrojî tune dike.
7 Ger li cem te hezar kes û li aliyê
te yî rastê deh hezar kes bikeve[1]
jî. nikare destê xwe li te bixe.

[1] Bimire.

8 Lê tuyê bi çavên xwe temaşe
bikî û cezaya xeraban bibînî.
9 Ji ber ku te, XUDAN ji xwe re
sitargeh, Bilindê Bilindan ji xwe
re kiriye xanî!
10 Dê xerabî neyê serê te û asîw
nêzîkî çadira te nebe.
11 Ji ber ku dê ew emir bide mil-
yaketên xwe, bona ku li her derê
ku tu here, te biparêzin.
12 Dê ew ê te li ser destên xwe
hilgirin[1], bona ku lingê te li kevi-
rekî nekeve.
13 Tuyê pêlî şêr û tûlemarê bike û
derbas bibe û şêrê ciwan û maran
bipelixîne.
14 Bona ku ji min hez dike[2], ez ê wî
xelas bikim, bona ku ew navê min
dinase, ez ê ji wî re bibim keleh.
15 Dema bangî min bike, ez ê
bersivê bidim wî, di tengasiyê de
ez ê li cem wî bibim; ez ê wî xelas
bikim û bilindtir deynim.
16 Ez ê wî bi temena dirêj ve têr
bikim û xelasiya xwe nîşanî wî
bidim!

**Zebûr 92**

1 Zebûr. Qesîdeyek ji bona Roja
Şabatê ye[3]. Ya XUDAN, ji te re
şikirî kirin, ya Bilindê Bilindan! û
bi Zebûran pesnahî dayîna navê te.
2 Sibê xêra wî û her şevê dilso-
ziya wî.
3 Li ser saza bi deh têlî û li ser
santûrê, li ser çenkê bi dengekî
biaheng ragihandin qenc e!
4 Ji ber ku te bi kirinên xwe, min
kêfxweş kir, ya XUDAN, li ber
karê destên te ez ê kêfxweş bi-
bim.
5 Kirinên te çiqas mezin in, ya
XUDAN! Ramanên te pirr kûr in!
6 Mirovê bêwac nizane û yê eh-
meq nikare aqil bigehîne.
7 Ger yên xerab, mîna gîha rîs bi-
bin û yên bi sûc, mîna gimûgê ve-
bin jî, vêya heta bêdawîbûnê dibe
tunebûna wan.
8 Lê belê tu heta bêdawîbûnê bi-
lind î, ya XUDAN!
9 Ya XUDAN, dê neyarên te bi
biryarî, belê, dê neyarên te bi
biryarî tune bibin, heçî kesê sûcan
dike, dê belav bibin.
10 Lê belê te min qasî gayekî hov
xwurt kir, zeyta teze bi ser serê
min ve rijand.
11 Û çavên min belav bûna ne-
yarên min bibînin, guhên min
dawiya xerabên êrîşî min kirine
bibihîzin.
12 Dê mirovê rast mîna xurmê
geş bibe, mîna serwiya Lubnanê
bilind bibe.
13 Di xaniyê XUDAN de hatiye
çikandin, dê di hewşên Xwedayê
me de geş bibin.

1 Ragirin, an jî: Bikişînin.
2 Bona ku xwe ji min ve girê daye.
3 Roja Sebtê.

14 Yên ûsa dema kalepîr bibin jî,
dê mêwe bidin, dê teze û hêşîn
bimînin.
15 Dê da ku: XUDAN rast e! Zi-
nara min e! Di wî de neheqî nîne!
bidin bihîstin.

**Zebûr 93**

1 XUDAN serweriyê dajo, bi
rewnaqiyê xemiliye; XUDAN
qudretê li xwe kiriye û pêçaye;
dinê[1] jî bi zexmî hatiye ava kirin,
dê nelerize.
2 Texta te ji berê de hatiye ava
kirin, hebûna te dirêjî bêberêbûnê
dibe!
3 Şêlav digurmin, ya XUDAN,
şêlav bi gurme gurmê dengê xwe
bilind kirin, şêlav şepêlên xwe
diçingînin.
4 XUDANê li bilindahiyan, ji
gurmîniya avên pirr, ji şepêlên
behrê yên harik hîn jî xwurttir e.
5 Şahdeyiyên te zehf dilsoz
in. Pîrozî liyaqî perestgeha te
ye, heta bêdawîbûnê, ya XU-
DAN.

**Zebûr 94**

1 Ya XUDAN, ya Xwedayê tol
hildanê, ronahiya xwe biweşîne,
ya Xwedayê tol hildanê!
2 Rabe, ya darazkerê rûyê erdê,
cezaya ku kancan li xwe heq kiri-
ne bide wan!

[1] Erd.

3 Dê yên xerab heta kengê, ya
XUDAN, heta kengê kêfxweş bi-
bin û bicoşin?
4 Ji devê wan kancî dirije, heçî
kesê sûcan dike, kêfxweş dibe.
5 Zulmê li gelê te dikin, ya XU-
DAN û eziyetê li gelê te dikin.
6 Ew bî û xerîban dikujin û ew
sêwiyan dikujin.
7 Û: XUDAN nabîne dibêjin û:
Xwedayê Aqûp bala xwe nadê.
8 Ya ehmeqên di nava gel de
ne, bala xwe bidinê! Û ya kesên
bêwac, hûn ê kengê baqil bibin?
9 Ma yê ku guh afirandiye, qey
nabihîze? Yê ku şiklê daye çavan
qey nabîne?
10 Ma yê netewan tîne rê, dê da-
raz neke? Yê mirovan perwerde
dike, nikare bizanibe?
11 XUDAN dizane ku, ramanên
mirovan vala ne.
12 Xwezî ji mirovê ku, ya XU-
DAN, te aniye ser rê û Zagona
xwe hînî wî kiriye!
13 Heta ku bona xeraban kortal bê
kolan, tu wî ji rojên teng ve xelas
dike û biaram dikî!
14 Ji ber ku XUDAN gelê xwe
red nake û gelê xwe naterikîne.
15 Ji ber dê dadî dîsa li ser rasti-
yê bê ava kirin û heçî kesên ku
dilê wan paqij in, dê li gor wê
bikin.
16 Dê kî li hemberî xeraban min
biparêze? Dê kî bona min, li dijî
bisûcan bisekine?

17 Ger XUDAN nebûya alîkarê min, canê min hema koçî warê bêdengiyê bibûna!

18 Dema ez: Lingê min dişemitin bibêjim, xêra te min li ser pêlan disekinîne, ya XUDAN.

19 Dema xem hundirê min bigirin, xemrevînên te dilê min kêfxweş dikin.

20 Ma xwediyê qoltixê yê ku bi spartina Zagonê ve neheqiyê bike, bi te re yek dibe?

21 Ew li hember canê rast ve yek dibin û yê bêsûc mehkûmî mirinê dikin.

22 Lê belê XUDAN ji min re bû keleh û Xwedayê min,
bû zinarê ku min xwe spartiye wê.

23 Û dê Xwedayê me XUDAN, xerabiya ku kirine, bîne serê wan; ji ber xerabiyên wan dê koka wan hişk bike, belê, dê koka wan hişk bike.

**Zebûr 95**

1 Werin, em bi kêfxweşiyê ji XUDAN re biqêrîn, ji zinarê xelas kirina me re qêrînên kêfxweşiyê bavêjin!

2 Bi şikiryê derkevin hizûra wî, qesîdeyên kêfxweşiyê ji wî re bilind bikin!

3 Ji ber ku XUDAN, Xwedayê mezin e û di ser hemû îlahan de qiralê bilind e.

4 Kûritiyên erdê di destê wî de ne û şaxên çiyayan jî yê wî ne.

5 Behr ya wî ye, ji ber ku wî afirand û destê wî şikil da bejahiyê jî.

6 Werin, em ji wî re peristinê bikin, xwe xwar bikin; li ber XUDANê me afirandiye çong bişkînin!

7 Ji ber ku ew Xwedayê me ye û em jî gelê mêrga wî û mîhên di bin destê wî de ne. Ger hûn îro dengê wî bibihîzin.

8 Li Merîba[1], mîna ku wê roja di çolê de, li Masayê[2] çê bû, dilê xwe hişk mekin.

9 Kirinên min dîtin, lê belê dîsa jî kalikên we li wir min ceribandin û hêçandin!

10 Ez çel salî ji wê nifşeya erjengî bûm û: Ev gelekî bêwefa ye gotim: Rêyên min nizanin.

11 Bo vê yekê, bi hêrs sondê xwarim: Tu carî nikarin têkevin warê minî aramiyê[3]!

**Zebûr 96**

1 Murxekî nû ji XUDAN re bibêjin! Ya hemûya rûyê erdê, murxan ji XUDAN re bibêjin!

2 Murxê bibêjin, pesna navê XUDAN bidin, her roj xelas kirina wî bidin bihîstin!

---

1 Têhilanin, têhilbûn (Binêr. 2.Mûsa.17:7)
2 Ceribandin (Binêr. 2.Mûsa.17:7
3 Warê minî aramiyê: Yanê erdê ku hatiye wad kirin (Binêr.4.Mûsa.14:26-35; Îbr. 4:1-7)

3 Rewnaqiya wî ji neteweyan re,
nuwazeyên wî ji hemû gelan re
bibêjin!
4 Ji ber ku XUDAN bilind e, ew
liyaqî pesnahiyê ye, ji hemû îla-
han zêdetir tirsehêz e.
5 Ji ber ku hemû îlahê gelan ne
tiştek in, lê belê yê ku ezmanan
afirandiye XUDAN e.
6 Rewnaqî û bilindahî di hizûra
wî de ne, hêz û xweşikî di perest-
geha wî de ne.
7 Ya gelno, hemûyên gelan bidin
XUDAN, hêz û bilindahiyan bi-
din XUDAN!
8 Rewnaqiya navê wî bidin XU-
DAN; pêşkêşiyan bînin û têkevin
hewşên wî!
9 Di nava kincên pîroz de, pe-
ristinê ji XUDAN re bikin! Li
ber wî bilerizin, ya hemûya rûyê
erdê!
10 Ji netewan re: XUDAN serwe-
riyê dajo! bibêjin. Dinya jî bi zex-
mî hatiye ava bûn, nalerize. Ew
netewan bi dadî ve daraz dike.
11 Bila ezman kêfxweş bibin û
rûyê erdê bicoşe! Bila bigurme
behr û hemûyên tê de ne!
12 Bila qir û yên li ser wê bi
kêfxweşiyê ve bicoşin! Wê çaxê
dê li ber XUDAN hemû darên da-
ristanê bi kêfxweşiyê ve biqêrin.
13 Ji ber ku ew tê! Ji ber ku ew
bona darazkirina rûyê erdê tê. Dê
ew ê dinê bi dadî û gelan jî bi ras-
tiya xwe ve daraz bike.

**Zebûr 97**

1 XUDAN serweriyê dajo, bila
rûyê erdê bicoşe; hemû girav û
qeraxên avê bila kêfxweş bin!
2 Ewr û reşe tarî dora wî girtine;
rastî û dadî ye bingeha textê wî.
3 Agir li ber wî dimeşe û neyarên
wî dişewitîne, yên li dorê ne.
4 Birûskên wî dinê ronahî kirin,
rûyê erdê dît û lerizî.
5 Çiya mîna şimayê heliyan, li ber
XUDAN, li ber Xudanê hemûya
rûyê erdê.
6 Ezmanan rastiya wî dan bihîstin
û hemûya gelan rewnaqiya wî
dîtin.
7 Bila bişermin yên ku ji pûtan re
peristinê dikin, yên ku pesnên xwe
bi pûtên vala ve didin! Ji wî re bi-
peristin, ya hemûyên îlahan[1]!
8 Siyon dema daraziyên te bihîst
kêfxweş bû, ya XUDAN û ba-
jarên Cihûda coşiyan.
9 Ji ber ku tu yî, ya XUDAN,
herî bilindê hemûya rûyê erdê, tu
di ser hemû îlahan de ye, tu pirr
bilind î.
10 Ya hûn, yên ku ji XUDAN hez
dikin, ji xerabiyê ve bikerihin!
Ew canê qûlên xwe yî dilsoz di-
parêze; wan ji destê xeraban ve
xelas dike.
11 Ji rastan re ronahiyê û ji yên dil-
paqij re jî kêfxweşiyê diweşîne.

1 Ji wî re secde bikin, ya hemûyên îlahan!

12 Ya yên rast, di XUDAN de kêfxweş bibin û pesna bîranîna navê wî yê pîroz bidin!

**Zebûr 98**

1 Zebûrek. Murxekî nû ji XUDAN re bibêjin! Ji ber ku wî nuwaze çêkir; bi destê xwe yî rastê û bi baskê xwe yî pîroz serfirazî qezenc kir.
2 XUDAN serfiraziya xwe têgîhand, rastiya xwe li ber çavê neteweyan ve raxist.
3 Xêr û dilsoziya xwe yî di derbarê gelê Îsraêlê de di bîr anî; çar hawirdorê dinê, serfiraziya Xwedayê me dîtin.
4 Ya hemûya dinê, bi kêfxweşiyê baneşanê ji XUDAN re bikin! Nişka ve baneşanê bikin û bi kêfxweşiyê bimurxînin û hemd bikin!
5 Bi lîrê ve Zebûran pêşkêşî XUDAN bikin û tevî lîr û mûsîkê!
6 Tevî borî û borîjenan, qêrînên kêfxweşiyê bavêjin li ber XUDANê ku Qiral e!
7 Bila bigurmin behr û yên di hundirê wê de ne, bila bigurmin rûyê erdê û yên li ser wê!
8 Bila çem çepika lêxin, çiya bi kêfxweşiyê ve biqêrîn, li ber XUDAN!
9 Ji ber ku ew tê bona darazkirina dinê: Ew ê daraziya dinê bi dadî û ya gelan jî bi rastiyê bike.

**Zebûr 99**

1 XUDAN serweriyê dajo: Bila gel bilerizin! Di nava Kerûbiyan de li ser texta xwe rûniştiye: Bila erd bilerize!
2 XUDAN li Siyonê mezin e û ew bilind e, serwerê hemû gelan e.
3 Bila pesna navê wî yî mezin û tirsehêz bidin! Ew pîroz e!
4 Û ya qiralê ji dadiyê ve hez dike! Te wekheviyê peyde kir, di nîjada Aqûp de yê rast û dadî te çêkir.
5 Xwedayê me XUDAN, bilindtir bikin û li ber kursiya ku di bin lingên wî de ye biperistin! Ew pîroz e.
6 Mûsa û Harûn di nav kahînên wî de bûn û Samûyêl jî di nava yên ku bangî navê wî kirine de ye; bangî XUDAN kirin û wî jî bersivê da wan.
7 Di nava sitûna ewran de bi wan re axifî; li gor qaîdeyên wî kirin, li gor Zagona ku daye wan.
8 Ya XUDAN Xwedayê me, te bersivê da wan! Tu bû Xwedayek efû kir, ji bo wan û xerabiyên ku kirine jî bê ceza nehişt.
9 Xwedayê me, XUDAN bilindtir bikin û biperistin di çiyayê wî yî pîroz de! Ji ber ku Xwedayê me, XUDAN pîroz e!

**Zebûr 100**

1 Zebûra bona spasdariyê. Ya hemûya dinê, ji XUDAN re, qêrînên kêfxweşiyê bavêjin!

2 Bi kêf ji wî re qûlitiyê bikin,
bi murxên kêfxweşiyê werin hi-
zûra wî!
3 Bizanibin ku XUDAN, Xwedê
ye. Yê ku me afirandiye ew e û
em jî yê wî ne[1], em gelê wî, mîhên
mêrga wî ne.
4 Bi şikiryê ve têkevin deriyên wî,
bi pesnahiyan jî bikevin hewşên
wî! Şikiryê ji wî re bikin, pesna-
hiyan pêşkêşî navê wî bikin!
5 Ji ber ku XUDAN qenc e; xêra
wî bêdawi ye û dilsoziya wî di
hemûya nifşeyan de didome.

**Zebûr 101**

1 Zebûra Dawid e. Ez ê xêr û da-
diya te bi murxan ve di bîr bînim;
pesnê te bi Zebûran ve bidim, ya
XUDAN!
2 Ez ê bala xwe bidim ku, bi
duristî têkiliyan deynim; tuyê
kengê were cem min? Ez di-
xwazim di hundirê mala xwe de
jiyanek bi kamiliya dilê xwe
bijîm.
3 Ez destûrê nadim ku nemerdî
li ber min çê bibe. Dikerihim ji
karên çivanokan.
bila bi min ve nezeliqe!
4 Bila dilekî rêşaş ji min ve dûr
be, ji ber ez naxwazim ku xerabi-
yê binasim.
5 Ez ê yê bi dizîka keftûlefta he-
valê xwe dike, tune bikim; nika-
rim, baldirêjiyê li mirovê bi xurûr
û ji jor ve dinêrin bikim.
6 Dê çavên min, li ser mirovên
dilsoz yên welat bibe, da ku, ew
li cem min rûnin; yê ku bi duristî
dijî, xizmetê ji min re bike.
7 Yê ku dek û dolaban dizivirîne,
dê li mala min rûnenê, yê ku de-
rewan dike, dê li ber çavên min
nesekinin.
8 Ez ê her sibehê xerabên li welat
tune bikim, bona ku hemûyên
neheqiyê dikin, ji welatê XUDAN
ve jê bikim û bavêjim.

**Zebûr 102**

1 Duaya belengazê dema lawaz
dikeve, derdê xwe ji XUDAN re
dibêje. Ya XUDAN, dua min bi-
bihîze, bila hawara min bigihêje te!
2 Di roja minî teng de wecê xwe
ji min veneşêre; guh bide dengê
min; dema bangî te bikim, hema
bersivê bide min!
3 Ji ber ku rojên min mîna duhê
tune dibin û hestiyên min mîna
agir dişewitin.
4 Dilê min mîna gîhayê hate lêxis-
tin û hişk bû; belê, heta xwarina
nan jî ji bîr kirim.
5 Ez bûm mîna çerm û hestiyekî,
ji ber nalîna bi jan û êş.
6 Ez kundê di cîhên tenha de di
bîr tînim, mîna civîka avkêş ya li
wêranxana ye me.
7 Xew nakeve çavên min, mîna ci-
vîka ku li ser banê tenê maye me.

[1] Em jî yê wî ne, an jî: Ne yê xwe nin.

8 Neyarên min di hemûya rojê
de heqaretê li min dikin; yên zi-
manên xwe dirêjî min dikin, navê
min bona naletê tînin zimên.
9 Ji ber ku tu xeyidî û hêrs bû;
xweliyê mîna nan dixwim
10 û hêstirên çavên xwe tevî ve-
xwarina xwe dikim; ji ber ku te
min rakir û avêt aliyekî.
11 Rojên min mîna siyên êvarî
dirêj dibin, tune dibin û ez mîna
gîhayan hişk dibim.
12 Lê belê tu, heta bêdawîbûnê
di textê xwe de rûdinê, ya XU-
DAN û dê bîranîna te di hemûya
nifşeyan de bidome.
13 Tuyê rabe û dilsoziyê nîşanî
Siyonê bide; ji ber ku dema
piştgirtina wê ye, dema ku li ben-
dê bûn hat.
14 Ji ber qûlên te, ji kevirên wê hez
dikin û heta ji toza wê jî hez dikin.
15 Dê netewe ji navê XUDAN û
qiralên rûyê erdê, ji rewnaqiya te
bitirsin.
16 Ji ber ku ger XUDAN, Siyonê
ji nû ve ava bike, dê di nava rew-
naqiya xwe de bê xuya kirin.
17 Dê guh bide dua xizanan û
li ber gerînên wan tu carî biçûk
nabîne.
18 Bila vana, bona nifşeya ku
were bên nivîsandin; ûsa ku, bila
mirovên ku hê nebûne, pesnahi-
yan pêşkêşî XUDAN bikin.
19 Ji ber ku XUDAN ji cîhê xwe
yî pîroz, ya li bilindahiya ye, li jêr
nihêrt, ji ezmanan çavnêriya rûyê
erdê kir.
20 Û bona bihîstina nalîna girti-
yan, bona xelas kirina mehkûmê
mirinê.
21 Bi vî awayî, dema gel û qira-
letî bi hev re bicivin û ji bo bi XU-
DAN ve biperistin.
22 Ûsa ku, navê XUDAN li Si-
yonê û pesnahiya wî li Orşelîmê
bidin bihîstin.
23 Wî di rêya jiyanê de hêza min
şikand, temena min kurt kir.
24 Ya Xwedayê min, di nava
temena min de canê min nestî-
ne! gotim; salên te, di hemûya
nifşeyan de didome!
25 Te gellekî ji berê ve bingehên
rûyê erdê ava kirin û ezman jî
berhemên destên te ne.
26 Ew ê tune bibin, lê belê tu pa-
yîdar î û dê ew gişt bibin mîna
kincekî kevin; tuyê wan, mîna
kirasekî buguherîne û dê derbas
bibin û herin.
27 Lê belê tu her tim wekî xwe ye
û dawiya salên te nîn in.
28 Dê zarokên qûlên te, di bin
çavnêriya te de bijîn û dê nîjada
wan, li ber çavên te bisekine.

**Zebûr 103**

1 Zebûra Dawid e. Pesnahiyê
pêşkêşî XUDAN bike ya canê
min! Pesnahiyan pêşkêşî navê wî
yî pîroz bike, ya hemûya hebûna
min!

2 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bike, ya canê min! Û tu qenciyên
wî, ji bîr meke!
3 Yê li hemû sûcên te buhurandi-
ye, yê ku hemû nexweşiyên te baş
kiriye.
4 Yê ku canê te ji kortala mirinê
ve xelas kiriye û yê ku taca hezki-
rin û dilovaniyê li te kiriye.
5 Yê ku di hemûya jiyanê de, te
bi qenciyan ve têr kiriye, ew e; bo
vêya ciwaniya te mîna huliyê nû
dibe.
6 XUDAN bona hemû belenga-
zan, dadî û mafê peyda dike.
7 Rêbazên xwe ji Mûsa re, karên
xwe ji lawên Îsraêlê re da xuyanî
kirin.
8 XUDAN dilovan û efûkar e, zû
hêrs nabe, xêra wî zehf e.
9 Her tim û tim bisûcdarî nake
û hêrsa wî, heta bêdawîbûnê na-
dome.
10 Bi me re, li gor gunehên me
têkiliyan daneniye û li gor berdêla
sûcên me neda.
11 Ji ber ku, ger ezman çiqas ji rûyê
erdê bilindtir bin, xêra wî jî ji bo
yên ku jê ditirsin re ewqas mezin e.
12 Rojhilat ji rojavayê çiqasî dûr
be, wî ewqasî serîhildanên me, ji
me dûr xistin.
13 Bavek çiqasî bi zarokên xwe
re dilovan be, XUDAN jî ji yên
ku jê ditirsin re ewqasî dilovan e.
14 Ji ber ku bi havêna me dizane,
axbûna me di bîra xwe de tîne.
15 Lê mirov, temena wî mîna
gîhayê ye; ew mîna çîçega qirê
geş dibe.
16 Ji ber ku gava ba bê, tune dibe
û diçe û cîhê ku lê bû, êdî wî di
bîra xwe de nîne.
17 Lê belê xêra XUDAN, heta bê-
dawîbûnê li ser yên ku jê ditirsin
e û dadiya wî, ji zarokê zarokên
wan re ne.
18 Ji bo yên ku li gor peymana wî
dikin û li nîjadên ku li pêy emirên
wî çûne û tînin bîra xwe ne.
19 XUDAN texta xwe li ezma-
nan ava kiriye û serweriya wî,
her derê digire nava xwe.
20 Pesnahiyê pêşkêşî XUDAN
bikin, ya hûn, milyaketên wî,
yên xwedî hêz in, yên gotinên wî
guhdarî dikin û tiştên ku dibêje
tînin cîh!
21 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin, ya hûn, hemûyên artêşên
wî, qûlên ku xwestekên wî tînin
cîh!
22 Pesnahiyan pêşkêşî XU-
DAN bikin, ya hemû afirên, li
cîhê ku ew serwer e! Pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bike, ya canê
min!

**Zebûr 104**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bike, ya canê min! Ya XUDAN,
Xwedayê min, tu çiqas mezin î!
Te rewnaqî û bilindahiyê li xwe
kiriye.

2 Mîna ku qeftanekî li xwe bike,
ronahiyê li xwe kiriye, yê ku ez-
manan mîna çadirekî dişidîne.
3 Xaniyê xwe li ser avên jor ava
dike, yê ewran ji xwe re dike ere-
be, li ser bazikê bayê digere,
4 Yê ku milyaketên xwe ji xwe re
kiriye ba û birûskan jî kiriye xu-
lam tu yî.
5 Wî rûyê erdê li ser bingehan ava
kir; bona ku tu carî nelerize.
6 Balûpalê mîna kincekê li wê kir;
av li ser çiyayan sekinî.
7 Dema tu hûrmiya, av reviyan,
dema te ezmanan gurmand, hema
vekişiyan.
8 Çiyayan derbas bûn û ber bi ne-
walan ve herikîn, ber bi cîhê ku te
bona wan bijartî bû.
9 Te sînorekê danî ber wan, bona
ku derbas nebin; nên û rûyê erdê
danegirin.
10 Kaniyên ku te di newalan de
pejiqandiye: Di nava çiyayan de
diherikin.
11 Avê didin hemû heywanên
qirê, tî bûna kerên bejî diqedîne.
12 Civîkên ezmanan li cem wan
hêlînan çê dikin, di nava guliyan
de diqebqeb in.
13 Tu ji mala xwe yî li ezmanan,
çiyayan bi av dike; rûyê erdê bi
mêwê karên te têr dibin.
14 Tu bona heywanan giha û bona
qenciya mirovan hêşînahiyan di-
gehîne. Bona ku mirov nanê xwe
ji axê ve derxînin.
15 Û xemra ku dilê wan kêfxweş
dike, zeyta ku wecê wan dikenîne
û nanê ku hêza wan zêde dike tim
tu didî.
16 Darên XUDAN, serwên Lub-
nanê yên ku wî bi xwe çikandiye
têrî avê dikin.
17 Civîk jî li wir hêlînê çê dikin;
lê hêlînên leglegan jî di selwiyan
de ne.
18 Çiyayên bilind warê bizinên
çiyayan, zinar jî cîhê stargeha
kurbeşikan[1] e.
19 Wî, bona xuyakirina demsalan
heyvê û roja ku dema avabûna
xwe dizane, afirand.
20 Tu navendê tarî dike û dibe
şev; heywanên daristanê dest bi
lewitînê dikin.
21 Şêrê ciwan li pêy nêçîrê dihûr-
me, ji Xwedê ve xwarinê dixwaze.
22 Dema roj dihilê, ew vedikişin
qullên xwe û radizên.
23 Mirov diçe karê xwe û bona ku
heta êvarî bixebite.
24 Ya XUDAN, çiqas berhemên
te hene! Te hemûyan bi zaniyariyê
ve ava kirine, rûyê erdê bi afirên
te ve tijî ne.
25 Behrên bê serî û binî, afirên bê
hejmar yên di nav wê de dilewi-
tin, afirên biçûk û mezin.
26 Li wir keştî digerin, bona ku
tê de bilîze, afirê te Lewyatan jî
li wir e.

1 Keroşk, kêvroşk, an jî: Kêrguh.

27 Hemû li benda te ne, bona ku
tu xwarina wan di wextê de bidî.
28 Gava tu bide, ew didin hev,
dema tu destê xwe veke, ew bi
qenciyê ve têr dibin.
29 Dema tu wecê xwe veşêre; di-
kevin toqînê, dema tu hilma wan
biçikîne; dimirin û dibin ax.
30 Dema tu ruhê xwe dişîne; ew
diafirin û tu rûyê erdê nû dikî.
31 Bila rewnaqiya XUDAN, heta
bêdawîbûnê bidome! Bi kirinên
xwe, bila XUDAN dilxweş be!
32 Dema ew binêre, rûyê erdê di-
lerize, dema ew dest dide çiya, ew
bi dû dibin.
33 Di hemûya temena xwe de ez ê
Zebûran ji XUDAN re bixwînim,
heta ku hebim, ji Xwedayê xwe
re, Zebûran bêjim.
34 Bila ramana min, bi wî xweş
bê xuya kirin, ez di XUDAN de
kêfxweş dibim!
35 Bila yên gunehkar li dinê
biqedin û tune bibin êdî yên xerab.
Ya canê min, pesnahiyan pêşkêşî
XUDAN bike! Pesnahiyan pêş-
kêşî XUDAN bikin[1]!

**Zebûr 105**

1 Şikiryê ji XUDAN re bikin,
bangî navê wî bikin; kirinên wî ji
gelan re bidin bihîstin!
2 Pesnahiya wî bi Zebûran ve bi-
din, hemû nuwazeyên wî bibêjin!
3 Bi navê wî yê pîroz pesnên xwe
bidin!
Bila dilê yên berî dane XUDAN,
kêfxweş bibe!
4 Li XUDAN û li hêza wî bige-
rin, bê sekin li wecê wî bigerin!
5 Ya nîjada Birahîmê qûlê wî ye,
ya kesên bijartiye, lawên Aqûp!
6 Nuwazeyên wî, karên wî yên
şaş dike û daraziyên ji devê wî
derdikevin, di bîr bînin!
7 Xwedayê me XUDAN ew e;
daraziyên wî, li ser hemûya rûyê
erdê ne.
8 Ew, peymana xwe, soza ku bona
hezar nifşeyî dayiye,
9 Peymana ku bi Birahîm re çêki-
riye, sonda ku bona Îshaq xwariye
heta bêdawîbûnê di bîr tîne.
10 Bi gotina: Ez ê bi mêrasa ku
ji we re heq bûye, welatê Kenanê
bidim we.
11 Vêya, bona Aqûp qaîdeyek,
bi Îsraêlê ve peymanek heta bê-
dawîbûnê derbas dibe çêkir.
12 Wê gavê kulmek mirov bûn,
bi hejmara hindik û xerîbê welatê
bûn.
13 Û ji neteweki, ber bi netewe-
yek din, ji welatekî ber bi wela-
tekî din geriyan û sekinîn.
14 Wî destûrê neda ku, kes zor-
destiyê li wan bike û di oxra wan
de bi qiralan ve jî xeyidî.
15 Destên xwe bi yên ku mesh
kirime ve nedin û xerabiyê li pey-
xamberên min nekin! got.

[1] Halelûya!

16 Û wî xelayê şand welat, hemû
xwarinên wan tune kir.
17 Wî li ber wan zilamekî şand,
viya, Ûsivê ku bi dîlitî hatibû firo-
tin bû.
18 Bi lêxistina zincîran, lingên
wî êşandin, toqa hesinî derbasî
histuyê wî kirin.
19 Heta ku gotinên wî hatin cîh,
gotina XUDAN wî ceriband.
20 Qiral zilam şand û Ûsiv da
berdan, Yê ku serwerê gelan e,
ew azad kir.
21 Wî, ew kir efendiyê qesra
xwe û kir berpirsiyarê hemû he-
bûna xwe.
22 Da ku, li gor xwestina xwe ser-
werên wan girê bide û aqil bide
yên wanî li pêş ve tên.
23 Û wê çaxê Îsraêl çû Misirê û
Aqûp li welatê Hamê ve bi cîh bû.
24 Û wî gelê xwe zehf zêde kirin.
Û wan bi hejmarî, ji neyarên xwe
ve zêdetir kirin.
25 Bona ku ji netewa wî bikeri-
hin, bona dek û dolaban li qûlên
wî bikin, wî dilên wan guhert
26 Wî qûlê xwe Mûsa û Harûnê
ku bijartibû şand.
27 Wan nîşanên wî, di nava wan
de çê kirin û di welatê Hamê de
mûcîze.
28 Wî tariyê şand û welêt bi tariyê
ve dagirt û ew ne li dijî gotinên
wî bûn.
29 Avên wan wergerand xwînê û
masiyên wan kuşt.
30 Li welat beq dibizûtin heta
odeyên qiralan.
31 Dema wî emir da keriyê
mêşan, kermêşan êrîşî her aliyê
welat kirin.
32 Wî li dêvila baranan zîpikan
barand, birûskan avêt welatê wan.
33 Û li rez û darên hêjîrê wan xist
û darên welat perçiqand.
34 Dema wî emir da, bê hejmar
kulî û kurmik hatin.
35 Û hemûya rehêlên[1] welat xwa-
rin û zadê zeviyên wan xwarin.
36 Û wî li welêt, hemûyên pêşiyê
bûyîne, zarokên pêşîn kuşt.
37 Û wî, ew bi zîv û zêra derxist û
ji eşîrên wan yek jî tilpekî nebû.
38 Dema ew çûn, Misir kêfxweş
bû; ji ber ku tirsa wan daketibû
ser Misiriyan.
39 XUDAN ewrê mîna rûberê li
ser wan raxist û şev agir da, bona
ku rêgehên wan ronî bike.
40 Wan xwestin, wî sûsikan şand
û bi nanê ezmanî zikê wan têr kir.
41 Wî zinar qelişand û av pejiqîn
û di erdên ziwa de mîna çemekî
herikî.
42 Ji ber ku soza xwe yî pîroz,
soza ku dabû Birahîm, di bîra xwe
de anî.
43 Wî gelê xwe di nava kêf-
xweşiyê de, bi qêrînên kêf-
xweşiyê yên ku wî bijartibû, ji
welêt ve derxistin.

---

[1] Nebat, rehek.

44 Û wî, erdên neteweyan da wan
û keda gelan bi mêrasî girtin.
45 Bona ku qaîdeyên wî bînin cîh
û li pêy Zagonên wî biçin. Pesna-
hiyan pêşkêşî XUDAN bikin[1]!

**Zebûr 106**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[2]! Şikiryê ji XUDAN re
bikin! Ji ber ku ew qenc e, xêra
wî bêdawî ye.
2 Kî dikare karên mezin yên XU-
DAN bîne ziman û kî dikare hemû
pesnahiya wî bide bihîstin?
3 Xwezî li yên ku li gor dadiyê
dikin, yên ku her tim ya rast di-
kin!
4 Ya XUDAN, dema tu xêrê ji
gelê xwe re bikî, min di bîr bîne;
dema tu wan xelas bikî bi min re
eleqeder bibe!
5 Ûsa ku, ez dewlemendiya kesên
ku te wan bijartiye bibînim.
Kêfxweşiya netewa te, pesnahiya
gelê te, bi wan re par bikim.
6 Me jî mîna kalikên xwe gune-
han kirin, me sûcan kirin, xerabi-
yê kirin.
7 Dema bapîrên me li Misirê
bûn, nuwazeyên ku te kiriye
fêhm nekirin, xêra ku te pirr ca-
ran da xuyanî kirin, di bîr neanîn
û di behrê de, di behra sor de serî
hildan.
8 Lê belê wî bona ku hêza xwe
xuyanî bike, di oxra navê xwe de
wan xelas kir.
9 Bi behra sor ve xeyidî, behr ziwa
bû û di balûpalê de bi pêşengiya
wî meşiyan, mîna ku di çolê de
bimeşin.
10 Û wan ji destê yên ku ji wan
dikerihin ve stend û ji lepê ne-
yarên wan, xelas kir.
11 Û av neyarên wan daqûrtandin,
qet yek jî ji wan xelas nebûn.
12 Wê gavê kalikên me bi gotinên
wî bawer bûn, bi gotina murxan
pesnê wî dan.
13 Çi heye ku, kirinên wî pirr zû
ji bîr kirin, li benda şîretdana wî
nesekinîn.
14 Û di çolê de, dilên wan bijiyan
xerabiyê û di cîhên tenha de Xwe-
dê ceribandin.
15 Wî xwestina wan da wan, lê
belê lawazî[3] şand canê wan.
16 Û wê demê, di artêşgehê
de çavnebariyê li Mûsa û li
Harûnê ku qûlê pîrozê XUDAN
e kirin.
17 Erd qelişî û Datanê daqurtand
û li ser Awîram û alîgirtên wî ve
hate girtin.
18 Û agir civata wan qemirand,
pêtekî yên xerab şewitand.
19 Li Horebê golikek çê kirin û ji
pûtekî rijandî re secde kirin.

[1] Halelûya!
[2] Halelûya!
[3] Nexweşiyek dikoje.

20 Û bilindahiya Xwedê, bi pû-
tekî gayê gîha dixwe ve guher-
tin.
21 Xwedayê ku wan xelas kiriye
ji bîr kirin; karên wî yên mezin yê
li Misirê çêkiriye.
22 Li bajarê Hamê nuwazeyên ku
afirandiye, di qeraxa behra sor de,
karên tirsehêz yên ku kiriye.
23 Bo vê yekê Xwedê tune kirina
wan got, lê belê qûlê wî yê pîroz
Mûsa, yê ku wî bijartiye,
di baxora li ber wî ye de sekinî û
wî ji hêrsa wî yî tune dike ve da
sekinandin.
24 Wan welatê xweşik jî bêrûmet
dîtin, bi soza ku Xwedê daye ba-
wer nebûn.
25 Di çadirên xwe de mire mir
kirin, dengê XUDAN guhdarî ne-
kirin.
26 Û bo vê yekê. XUDAN destê
xwe hilda û bona ku dê wan di
çolê de, li erdê raxe.
27 Û nîjada wan, di nava nete-
wan de belav bike û bona ku wan
belavî welatên din bike, sondê
xwar.
28 Û dawiyê pişta xwe bi Baal-
Peor ve girê dan û qurbanên ku
ji miriyan ve hatiye pêşkêş kirin.
xwarin.
29 Û bi kirinên xwe XUDAN
bi hêrs kirin û di nava wan de
nexweşiya belavbûnê derket.
30 Wê gavê Pînehas rabû û darazî
da û asîw hate birrîn.
31 Û vêya ji wî re bi rastî hate
hesibandin, dê vêya di hemûya
nifşeyan de, heta bêdawîbûnê bi-
dome.
32 Û dîsa XUDAN bi hêrs kirin li
cem avên Merîba û ji ber wan, bo
Mûsa nebaş bû.
33 Ji ber ku ruhê wî xeyidandin,
ew jî bi lêvê xwe bê raman axifî.
34 Mîna ku XUDAN emir daye
wan, gelan tune nekirin.
35 Lê dijî vêya tevî neteweyên din
bûn û hînî kevneşopên wan bûn.
36 Bi pûtên wan ve peristîn û ev jî
ji wan re bûn dafik.
37 Û wan, lawên xwe û keçên
xwe, ji cinan re qurban kirin.
38 Û bona ku ji pûtên Kenanê
re bibin qurban, xwîna lawên
xwe û keçên xwe, xwîna bêsûcan
rijandin û welat bi xwîna wan ge-
marî bû.
39 Û bi vî awayî, bi kirinên xwe
biqirêj hatin hesibandin û bi
kevneşopên xwe ve zinê kirin.
40 Hêrsa XUDAN, li dijî gelê wî
sor bû û ji gelê xwe ve kerihî.
41 Û wan da destê netewan û yên
ku ji wan dikeribîn, bûn serwerê
wan.
42 Û neyarên wan, wan eciqandin
û wan di bin destê neyar de histu
xwar kirin.
43 XUDAN pirr caran wan xelas
kir, lê belê hiş û ramanên wan li
ser serîhildanê bû û ji ber sûcên
xwe hatin kêm kirin.

44 Lê belê dema ku wî hawarên
wan bihîst, li tengasiyên wan
nihêrt[1].
45 Û di oxra wan de peymana
xwe di bîr anî û li gor xêra xwe yî
bêmînak, dev ji kirinên xwe berda.
46 Û wî, dilovaniyê xist dilê yên
ku wan bindest kirine.
47 Me xelas bike, ya Xwedayê
me, XUDAN û me ji nava nete-
weyan bide ber hev, ku em ji navê
te yî pîroz re şikiryê bikin, bi pes-
nahiya te serbilind bibin.
48 Bila pesnahî, ji Xwedayê
Îsraêlê XUDAN re be! Ji
bêpêşîbûnê, heta bêdawîbûnê,
bila hemû netewe bêje: Amîn!
Bila pesnahî ji XUDAN re be[2]!

PIRTÛKA PÊNCEMÎN (5)

**Zebûr 107**
1 Ji XUDAN re şikir bikin, ji ber
ku ew qenc e, ji ber ku xêra wî
bêdawî ye!
2 Bila ûsa bibêjin, yên ku XU-
DAN wan xelas kiriye, yên ku wî,
wan ji lepên neyar ve azad kiriye.
3 Yên ku wî ji bakur û başûr[3], roj-
hilat û rojava ve ji hemû welatan
ve daye ber hev.
4 Ew di çolên tenha de geriyan,
bajarekê ku dê li wir bi cîh bibin
nedîtin.
5 Tî, birçî û canên wan di hundirê
wan de perîşan bûn.
6 Wê çaxê di nava tengasiyê de,
li ber XUDAN geriyan, XUDAN
wan ji tengasiyên wan xelas kir.
7 Û heta ku bigihêjin bajarekî bi
cîh bibin, di rêya rast de pêşengiyê
ji wan re kir.
8 Bila ji bo xêra wî, şikiryê ji XU-
DAN re bikin û bona nuwazeyên
ku ji bo qenciya mirovan çêkiriye!
9 Ji ber ku ew, tîbûna canên tî
bûne dide birandin û canê birçî bi
qenciyan ve têr dike.
10 Girtiyên zincîr kirî û bi jan di-
naliyan û di tariyê de, di tariyekî
kûr de rûniştî bûn.
11 Ji ber ku li hemberê gotinên
Xwedê serî hilda bûn û şîreta Bi-
lindê Bilindan biçûk dîtibûn.
12 Bi karên giran ji dilê wan re
kir jahr, ketin û alîkarên wan tune
bû.
13 Wê çaxê di nava tengasiyê de li
ber XUDAN geriyan û XUDAN
wan ji derdê wan xelas kir.
14 Wan ji tariyê derxist, ji tariya
mirinê û zincîrên wan qetand.
15 Bila bona xêra wî, şikirî ji XU-
DAN re bikin û bona nuwazeyên
ku ji bo qenciya mirovan çêkiriye!
16 Ji ber ku deriyê tûncî şikenand
û milên deriyên hesinî, wî perçi-
qand.

[1] An jî: Lê XUDAN, disa ji bi tengasiyên wan ve eleqeder bû, dema li bergerinên wan bihist.

[2] Halelûya!

[3] Başûr, an jî: Ji behrê ve.

17 Yên bêwac cezayê xwe dîtin, ji ber sûc û serîhildanên xwe.
18 Ûsa bûbû ku, ji hemû xwarinan erjeng dibûn û ew nêzîkî deriyên mirinê bûbûn.
19 Wê çaxê di nava tengasiyê de li ber XUDAN geriyan û XUDAN wan ji tengasiyên wan xelas kir.
20 Gotina xwe dişîne û wan baş dike û wî, wan ji kortala mirinê ve xelas kir.
21 Bila bona xêra wî, şikiryê ji XUDAN re bikin û bona nuwazeyên ku ji bo qenciya mirovan çêkiriye.
22 Û bila qurbanên şikiryê pêşkêş bikin û bi murxên kêfxweşiyê kirinên wî bidin bihîstin!
23 Yên ku bi keştiyan ve dikevin behran û di oqyanûsan de kar dikin.
24 Wan karên XUDAN û nuwazeyên ku di kûritiyan de kiriye, dîtin.
25 Ji ber ku dema wî emir da bahozek bihêz hat û şepêl rabûn ser pêlan.
26 Keştî rabûn ezmanan û daketin biniyan; ji tengasiyê canê keştîvanan hate pozên wan.
27 Mîna serxweşan tilpekî bûn û lerizîn û hemû zanyariya wan bû tuneyek.
28 Wê çaxê di nava tengasiyê de li ber XUDAN geriyan û XUDAN wan ji tengasiyên wan xelas kir.
29 Ew, bahozê dike mîna ya strîngehê û şepêl jî aş dibin.
30 Û dema rehet bûn, kêfa wan hate cîh û wî, wan bir strîngeha ku ew dixwazin.
31 Bila ji ber xêra wî şikiryê ji XUDAN re bikin û bona nuwazeyên ku ji bo mirovan çêkiriye.
32 Û bila wî, di civaka gel de bilindtir bikin û pesnahiyê pêşkêşî wî bikin, di civaka yên ku di pêş ve tên de.
33 Ew çeman verdigerîne çolê û kaniyan jî (verdigerîne) axa ziwa.
34 Zeviyên bi berdar verdigerîne axa dihm, ji ber xerabiya yên ku li wir dijîn.
35 Ew çolê verdigerîne kortikê avê û axa ziwa jî dike çavkanî.
36 Û birçiyan li wir bi cîh dike û bona ku bajarekî rûniştinê ava bikin.
37 Û zeviyan biçînin û rezan biçikînin, bona ku zadê zêde bistînin.
38 Û bi pîroz kirina XUDAN û heta ku tu bibêje zêde bûn û heywanên wan kêm nekirin.
39 Û pişt re kêm bûn, nizm bûn, ji ber êş û tengasî û zordestiyê.
40 XUDAN rezaletê[1] li ser biesilan de dirijîne û wan eware digerîne;
di çolekî rê û şop nayê xuya kirin de.

[1] Hetiketiyê, xaxiyê.

41 Lê belê belengazan ji xizaniyê
ve xelas dike û mîna keriyê pezan
malbatên wan zêde dike.
42 Dê mirovên rast bibînin û
kêfxweş bibin û yên xerab jî dê
devê xwe bigirin.
43 Yê ku aqilê wî hebe, bila vana
bide ber çavan û bala xwe bide
xêra XUDAN.

**Zebûr 108**

1 Qesîde[1]. Zebûra Dawid e. Dilê
min bi biryar e, ya Xwedê!Ez ê bi
hemû hebûna xwe, ji te re murxan
û Zebûran bibêjim!
2 Hişyar be ya lîr, ya çenk! Ez
berbangê hişyar bikim!
3 Ez dixwazim ku, di nava gelan
de pesnahiyan pêşkêşî te bikim,
ya XUDAN û di nava netewan
de, bi Zebûran pesnê te bidim.
4 Ji ber ku xêra te ji ezmanan me-
zintir e û dilsoziya te digihêje heta
ezmanê.
5 Ya Xwedê, bi ser ezmanan ve
bilind bibe û bila rewnaqiya te,
hemûya rûyê erdê dagire!
6 Bi destê xwe yî rastê me xelas
bike, piştgiriyê bide me, bona ku
hezkirên te bigihêjin azadiyê!
7 Xwedê, di qatê xwe yî pîroz de
axifî
Ez ê Şekemê bi kêfxweşiyê ve
par bikim û newala Sûkotê bipî-
vim.
8 Gîlad ya min e, Manaşşe jî ya
min û Efrayîm kumzirxa min,
Cihûda çoyê minî daraziyê ye.
9 Moab legana minî xwe şuştinê;
ez ê pêlava xwe bavêjim ser
Edomê; bi Filistîn jî bi kêfxweşiyê
ve biqêrim.
10 Dê kî min bibe bajarê bi keleh?
Ma kî dê heta Edomê rê nîşanî
min bide?
11 Ya Xweda, ma te me red nekir?
Ya Xweda, ma tu êdî pêşengiyê ji
artêşên me re nakî?
12 Li hemberê neyaran, alîkariyê
bi me re bike! Ji ber ku alîkariya
mirovan vala ye.
13 Em bi Xwedê ve serfiraziyê
qezenc dikin û ew neyarên me di-
pelixîne.

**Zebûr 109**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ya Xwedayê ku pesna-
hiyan pêşkêşî wî dikim, bêdeng
nemîne!
2 Ji ber ku xerab û derewçînan, li
dijî min devê xwe vedikin, reşiyê
li min dixin.
3 Û bi gotinên nefretê ve dora
min girtin û bêsedem şer li min
vekirin.
4 Li berdêla hezkirina min, bûn
neyarên min; lê belê ez tim dua
dikim.
5 Û bersiva qenciya min bi xera-
biyê û ya hezkirina min bi nefretê
ve dan.

---
[1] An jî: Murx.

6 Zilamekî xerab deyne serê wî û
bila di aliyê wî yî rastê yekî wî bi
sûc bike bisekine![1]
7 Dema ku ew bê daraz kirin, bila
bi sûc derkeve û heta duaya wî jî
bila guneh bê hesibandin!
8 Bila temena wî kurt be, yekî din
wezîfa wî bigire ser xwe!
9 Bila zarokên wî sêwî, pîreka wî
jinebî bimîne.
10 Û bila lawên wî, eware bigerin
û parsê bikin û li dûrî mala xwe yî
xerabûyî li xwarinê bigerin!
11 Bila hemûya malên wî têkeve
tora selefkar û keda wî ji aliyê bi-
yanan ve bê talan kirin.
12 Bila yê ku xêrê bi wî bike, tune
be û bila heyfa kesekî bi sêwiyên
wî neyê!
13 Bila nîjada wî bê birrîn, bila
paşî nifşeyekî din, navê wî tune
bibe.
14 Bila sûcê bapîrên wî, li ber XU-
DAN bên bîr anîn û bila gunehên
dayika wî neyên paqij kirin!
15 Bila gunehên wî, tim li ber
XUDAN bisekine û bila ew
bîranînên wî, ji rûyê erdê ve tune
bike!
16 Ji ber ku ew, nîşandana hez-
kirinê ne fikirî, lê belê bona ku
bikuje zordestiyê li xizan, belen-
gazan û dilşikestiyan kir.
17 Û bila naleta ku jê hez dike
were serê wî! Û madem ku ji
pîrozbûnê hez nake, bila pîrozbûn
ji wî ve dûr be!
18 Û naletê mîna kincekî li xwe
kir, bila nalet mîna avê bi hûndirê
wî û mîna rûnê bi hestiyên wî ve
here!
19 Bila mîna kincekî wê li xwe
dike û mîna şûtikekê tim wê
bipêçe bibe!
20 Bila XUDAN bi vî awayî, ber-
sivê bide neyarên min û yên bo
canê min xerabiyê dibêjin!
21 Lê belê tu, ya Xudan, XU-
DAN, di oxra navê xwe de ele-
qayê nîşanî min bide; min xelas
bike, di oxra hezkirin û qenciya
xwe de!
22 Ji ber ku ez xizan û belengaz
im û dilê min, di hundirê min de
birîndar e.
23 Ez mîna siya ku direêj dibe
derbas bûm, mîna kuliyekî têm
weşandin û avêtin.
24 Çongên min, ji rojî girtinê di-
lerizin û ez bûm wekî çerm û hes-
tiyekî.
25 Û ez bûm rûreşiya dijminên
xwe; dema ew min dibînin, serê
xwe kil dikin!
26 Alîkariyê bi min re bike, ya
XUDAN, Xwedayê min! Min di
oxra xêra xwe de xelas bike!
27 Bila bizanibin ku, di vî karî de
destê te heye, yê ku vêya kiriye tu
yî, ya XUDAN!

*1* Li gor hinek şirovekiran van ayetana, axaftina neyarên Dawid in.

28 Bila ew naletê li min bikin,
lê tu min pîroz bike; ger ew êrîşî
min bikin, dê şermezar bibin; lê
belê dê qûlê te kêfxweş bibe!
29 Yên ku min bi sûc dikin,
bila bi rezîltiyê ve bixemilin û
mîna qeftanê li xwe dikin, bila
bi şermezariyên xwe, xwe bu-
xumînin!
30 Ez ê ji XUDAN re zehf şikiryê
bikim, di nava ajawê de pesnahi-
yan ji wî re rêz bikim.
31 Ji ber ku ew di rastê xizan de
disekine, bona ku wî ji darazkerên
wî xelas bike.

## Zebûr 110

1 Zebûra Dawid e. XUDAN, ji
Xudanê min re got: Heta ku ez
neyarên te ji lingên te re pêlik
deynim, li rastê min rûnê!
2 Dê XUDAN ji Siyonê ve, çoyê
te yî qudretê bişîne, di nava ne-
yarên xwe de serweriyê bajo!
3 Di roja te yî qudretê de, dê gelê
te, bi dilî biçin. Mîna xunava ji
sînga sibehê ve zayiye,
dê di nava kincên pîroz de, xortên
te werin cem te.
4 XUDAN sond xwar û ji qirara
xwe venagere: Li gor Sazûmana
Melkîsedek, tu heta bêdawîbûnê
kahîn î! got.
5 Xudan li aliyê te yî rastê ye, roja
ku hêrs bibe, dê qiralan bieciqîne.
6 Di nava netewan de daraz bike,
dê navendê bi cesedan ve dagire û
li çar hawirdora dinê seriyan bie-
ciqîne.
7 Dê ji çemên li qeraxa rêgehê
ye avê vexwe; bo vê yekê dê serê
xwe bilind bike.

## Zebûr 111

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]! Ez ê bi hemûya dilê xwe
şikiryê ji XUDAN re bikim;
di civaka rastan de û di nava ci-
vatê de!
2 Karên XUDAN mezin in, yên
ji wan zewqê digirin, her tim wan
difikirin.
3 Kirinên wî bilind û bi rewnaq
in û rastiya wî heta bêdawîbûnê
didome.
4 Wî karên xwe yên şaş dikin di
bîr anî, XUDAN, xêrxwaz û di-
lovan e.
5 Xwarinê dide, yê ku jê ditirsin;
ew heta bêdawîbûnê peymana
xwe di bîr tîne.
6 Bi dayîna erdên neteweyên din,
ku da gelê xwe hêza karên xwe ji
wan re da xuyanî kirin.
7 Di her karê ku dike de dilsoz û bi
dad e, hemû hoyên wî ewlekar in.
8 Heta bêdawîbûnê didome, bi
dilsozî û rastiyê ve tên çêkirin.
9 Wî xelasiya gelê xwe pêk anî,
peymana xwe heta bêdawîbûnê
derbas dibe danî, navê wî pîroz û
tirsehêz e.

[1] Halelûya!

10 Bingeha zaniyariyê ji XUDAN
ve tirsîn e, heçî kesê ku emirên wî
bîne cîh, dibe xwedî rast dîtinê.
Pesnahiya wî heta bêdawîbûnê
disekine!

**Zebûr 112**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]! Xwezî li mirovê ku ji XU-
DAN ve ditirse, yê ji emirên wî
zewqa mezin digire!
2 Dê nîjada wî li rûyê erdê bihêz
bibe, dê nifşeya rastan bê pîroz
kirin.
3 Zêdeyî û dewlemendî ji mala
wî kêm nabe û rastiya wî heta bê-
dawîbûnê didome.
4 Di tariyê de, bona rastan ronahî
dizê; ew dilovan, xêrxwaz û du-
rist e.
5 Xwezî li mirovê ku, li ber dike-
ve û bi deyn dide, karên xwe bi
dadî dimeşîne!
6 Ew tu carî nalerize; heta bê-
dawîbûnê di bîr de tê.
7 Ji nûçeya xerab natirse; dilê wî
nalerize, bi XUDAN ve ewle ye.
8 Dilê wî zexm e, ew natirse, di
dawiyê de, binketina neyarên xwe
dibîne.
9 Malên xwe bi comerdî belavî
xizanan dike; rastiya wî, heta bê-
dawîbûnê didome; hêz û birêziya
wî zêde dibe.
10 Dema kesê xerab vêya dibîne,
har dibe, diranê xwe diqirçîne,
xwe dixwe û diqedîne, xwesteka
xeraban tune dibe.

**Zebûr 113**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[2]! Ya qûlên XUDAN; pes-
nahiyan bidin, pesnahiyan ji navê
XUDAN re bidin!
2 Ji niha ve heta bêdawîbûnê, bila
şikirî ji navê XUDAN re be!
3 Ji rojhilatê û heta rojava, divê
pesnahî ji navê XUDAN re bên
pêşkêşî kirin!
4 XUDAN serwerê hemû nete-
weyan e, rewnaqiya wî ezmanan
derbas dike.
5 Ma mîna Xwedayê me XUDAN
kî heye, yekî li ezmanan rûniştiye;
6 Bona nêrîna yên li rûyê erdê û
ezmanan ve xwar dibe?
7 Yê belengaz ji erdê ve radike,
yê xizan ji sergo[3] bilind dike.
8 Bona bi esilan, bi esilên gelê
xwe ve bide rûniştinê.
9 Pîreka stewr, li malê dide
rûniştinê û dike dayikek xwedî
zarokan û kêfxweş. Pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bikin[4]!

**Zebûr 114**

1 Dema Îsraêl ji Misirê ve, nîjada
Aqûp ji cem gelekî bi zimanê bi-

1 Halelûya!
2 Halelûya!
3 Zibildan, çopgeh.
4 Halelûya!

yanî ve diaxife derket, 2 Cihûda
bû cîhê pîroz ya Xudan, Îsraêl jî
qiraletiya wî.
3 Behr ya ku dibe dît û vekişiya,
çemê Urdunê li şunda zivirî.
4 Çiya mîna beranan, gir jî mîna
berxikan hol bûn.
5 Ya behr, ma ji te re çi bû ku tu
reviya? Ya Urdun, çima tu li dijî
xwe herikî?
6 Ya çiyano, çima hûn mîna be-
ranan, ya girno, çima hûn mîna
berxikan hol bûn?
7 Bilerize, ya rûyê erdê, li ber
Xudanê ku zinarê verdigerîne
burkê, 8 kevirê hestê jî verdigerî-
ne kaniyê, di hizûra Xwedayê
Aqûp de!

**Zebûr 115**

1 Ne me, ya XUDAN, ne me, di
oxira xêr û dilsoziya xwe de, navê
xwe bilindtir bike!
2 Çima bila netewe: Kanê li ku ye
Xwedayê wan? bibêjin.
3 Lê belê Xwedayê me li ezmana
ye, çi bixwaze, dikare bike.
4 Lê belê pûtên wan, ji zêr û zîvê
hatine çê kirin, berhemên destê
mirovan e.
5 Devê wan hene û nikarin biaxi-
fin; çavên wana hene û nabînin:
6 Guhên wan hene û nabihîzin:
pozên wan hene û bêhnê nagirin:
7 Destên wan hene û hês nakin:
lingên wan hene û nameşin, ji qi-
rika wan deng dernakeve.
8 Heçî kesên ku wan çê kirine,
bi wan ewle dibin, dê bibin mîna
wan!
9 Ya gelê Îsraêlê, bi XUDAN ve
ewle be! Ew e, alîkarê we û mer-
talê we.
10 Ya nîjada Harûn, bi XUDAN
ve ewle be! Ew e, alîkarê we û
mertalê we.
11 Ya yên ji XUDAN ve ditirsin,
bi XUDAN ve ewle bin! Ew e,
alîkarê we û mertalê we.
12 Dê XUDAN, me di bîr bîne
û pîroz bike, mala Îsraêlê, pîroz
bike, mala Harûn, pîroz bike!
13 Dê biçûk û mezin, heçiyên ji
XUDAN ditirsin, pîroz bike!
14 Bila XUDAN we, we û za-
rokên we zêde bike!
15 XUDANê ku erd û ezman
afirandiye, bila we pîroz bike!
16 Ezman, ezmanên XUDAN in,
lê belê rûyê erdê daye mirovan.
17 Yên mirî, yên daketine warê
bêdengiyê pesnahiyan pêşkêşî
XUDAN nakin;
18 Lê belê em ji niha ve heta bê-
dawîbûnê pesnê XUDAN bidin[1].
Pesnahiyê pêşkêşî XUDAN bikin[2]!

**Zebûr 116**

1 Ez ji XUDAN hez dikim, ji ber ku
ew deng û lavayên min dibihîze.

[1] An jî: XUDAN bilind bikin.
[2] Halelûya!

2 Ji ber ku guh dide min û heta ku
ez bijîm, ez ê bangî wî bikim.
3 Tayên mirinê dora min girtin
û tengasiyên warê miriyan rastî
min hatin, ez jî rastî êş û tenga-
siyê hatim.
4 Wê çaxê ez li ber XUDAN ge-
riyam: Eman, ya XUDAN, canê
min xelas bike! gotim.
5 XUDAN xêrxwaz û bi dadî ye,
Xwedayê me dilovan e.
6 XUDAN mirovên pak diparê-
ze; gava ez çikiyam wî min xelas
kir.
7 Ya canê min, dîsa vegere arami-
ya xwe! ji ber ku XUDAN qenci-
yê ji te re kir.
8 Ji ber ku te canê min ji mirinê,
çavên min ji hêsiran, lingên min
ji tilpekîbûnê ve xelas kir.
9 Ez ê di warê zindiyan de, di hi-
zûra XUDAN de bimeşim.
10 Baweriya xwe anîm, dê ji ber
vê yekê bibêjim; lê ez zehf zebûn
bûm[1].
11 Di nava şaşiya xwe de, gotim
ku:
Hemû mirov derewçîn in!
12 Ma ez dikarim çi bersivê bidim
XUDAN, ji ber ewqas qenciyên
ku ji min re kiriye?
13 Ez ê bi pêşkêşiya xelasbûnê
qedehê bilind bikim û bangî navê
XUDAN bikim.
14 Li ber hemû gelê wî, belê, ez ê
qewlên ku min ji XUDAN re dan,
bînim cîh.
15 Di çavên XUDAN de biqîmet
e[2], mirina qûlên wî, yên dilsoz.
16 Ya XUDAN, ez bi rastî jî qûlê
te me; qûlê te, lawê xizmetkarê te
me.
17 Ya XUDAN, ez ê bangî navê
te bikim û qurbana şikiryê pêşkêşî
te bikim.
18 Ez ê qewlên xwe yî bona XU-
DAN dame, bînim cîh, belê, li ber
hemûya gelê wî.
19 Di hewşên Perestgeha XU-
DAN de, di cîhê navenda te de,
ya Orşelîm!
Pesnahiyê pêşkêşî XUDAN
bikin[3]!

**Zebûr 117**

1 Ya hemûyên neteweyan, pes-
nahiyê pêşkêşî XUDAN bikin!
Ya hemûyên gelan, wî bilindtir
bikin!
2 Ji ber ku, xêra wî, ya bo me
mezin e û rastiya XUDAN heta
bêdawîbûnê didome, pesnahiyê
pêşkêşî XUDAN bikin!

**Zebûr 118**

1 Şikiryê ji XUDAN re bikin!
Ji ber ku ew qenc e, xêra wî bê-
dawî ye!

---

1 An ji: Baweriyê anim, bo vê yekê axifim. Êşeki mezin dikişinim (2. Kor. 4:13).

2 Biqimet e; an ji: Tahl e (nexweş e).

3 Halelûya!

2 Xêra wî bê dawî ye! bila Îsraêl
bibêje.
3 Ji ber ku, xêra wî bê dawî ye!
bila mala Harûn bibêje.
4 Ka bila bêjin: Xêra wî bê dawî
ye! yên ji XUDAN ve ditirsin.
5 Di nava tengasiyê de bangî XU-
DAN kirim; XUDAN bersivê da
û min gîhand aramiyê.
6 XUDAN li aliyê min e, ez na-
tirsim; ma mirov dikare çi bi min
bike?
7 XUDAN li aliyê min e, alî-
karê min e û ez ê bi serfiraziyê
li dawiya yên ji min dikerihin
binêrim.
8 Bi XUDAN ve sitirîn, ji ewle-
bûna mirovan qenctir e.
9 Bi XUDAN ve sitirîn, ji ewle-
bûna biesilan qenctir e.
10 Hemû netewan dora min gir-
tin, min bi navê XUDAN, wan
pejiqand.
11 Rabûn, dora min girtin, belê,
dora min girtin: min bi navê XU-
DAN wan pejiqand.
12 Mîna mozan dora min girtin:
lê belê mîna agirê keleman tefi-
yan; min bi navê XUDAN, wan
pejiqand.
13 Bona ku bikevim te bihêz min
nuqurçand; lê belê XUDAN alî-
karî bi min re kir.
14 XUDAN hêz û Zebûra min e û
ew bû xelaskerê min.
15 Qêrînên serkeftin û kêfxwe-
şiyê, di çadira rastan de diçinge:
Destê rast yê XUDAN, karên
bihêz çêdike!
16 Destê rast yê XUDAN sereta
ye, destê rast yê XUDAN karên
bihêz dike!
17 Ez namirim, ez ê bijîm û ki-
rinên XUDAN bidim bihîstin.
18 XUDAN min bi dijwariyê ve
anî rê, lê belê min neda mirinê.
19 Deriyê dadiyê ji min re vekin:
Ez dixwazim têkevimê û şikiryê ji
XUDAN re bikim.
20 A vay, deriyê XUDAN ev e!
Yên rast, dê têkevin wir.
21 Ez şikiryê ji te re dikim, ji ber
ku te bersivê da min û tu bûyî xe-
laskerê min.
22 Kevirê ku hostayan red kirin,
bû kevirê serê quncikê.
23 Ev kar ji XUDAN ve bû û ew
di çavên me de karekî nuwaze ye!
24 Roja ku XUDAN afirandiye ev e,
em di wê de kêfxweş bibin û bicoşin!
25 Çi dibe, ya XUDAN, me xe-
las bike! Çi dibe, ya XUDAN, me
serfiraz bike!
26 Bila yê bi navê XUDAN tê,
pîroz be! Em ji mala XUDAN,
we pîroz dikin!
27 XUDAN, Xwedê ye û wî ro-
nahî da me, qurbana cejnê, bi
benan girê bidin[1]; heta qiloçên
pêşkêşgehê, pêş ve herin.

[1] Qurbana cejnê, bi benan girê bidin: an ji: Bi darên di destên we de ne cejnê pîroz bikin.

28 Xwedayê min tu yî û ez şikiryê ji te re dikim; Xwedayê min tu yî, te bilindtir dikim.
29 Ji XUDAN re şikir bikin! ji ber ku ew qenc e, ji ber ku xêra wî bêdawî ye.

**Zebûr 119**

*ALEF*[1]

1 Xwezî li kesên ku rêyên wan paqij in, yên ku di Zagona XUDAN de dimeşin!
2 Xwezî li yên ku, li gor şîretên wî dikin, yên bi hemû dilên xwe li wî digerin;
3 yên qet neheqiyê jî nakin; di rêyên wî de dimeşin!
4 Te emir da ku, bila bala xwe bidin şertên ku te danîne!
5 Xwezîka bo ku ez Zagona te bigirim, rêyên min bên zexm kirin!
6 Heta ku ez li pêy hemû emirên te herim, tu carî şermezar nabim.
7 Her ku hînî daraziyên te yî dadî bibim, ez ê bi dilekî paqij şikiryê ji te re bikim.
8 Ez ê Zagonên te bînim cîh, min tu carî bernede!

*BEYT*

9 Mirovê ciwan, çawa rêya xwe paqij digire? Li gor gotina te bi pê girtina wî ve.
10 Ez bi hemûya dilê xwe li te geriyam, destûrê nede ku ez ji emirên te şaş bibim!
11 Gotina te, di dilê xwe de veşartim, bona ku li dijî te gunehan nekim.
12 Bila pesnahî ji te re be, ya XUDAN! Zagonên xwe hînî min bike!
13 Hemû seretayên ji devê te derdikevin, ez bi lêvên xwe dîsa dibêjim.
14 Dema li pêy şîretên te diçim, kêfxweşiyê dibihîzim, mîna ku hemû xezîne dibin yên min.
15 Ez şertên te kûr difikirim û çavnêriyê li rêyên te dikim.
16 Ez ji Zagonên te zewqê digirim, ez gotina te ji bîr nakim.

*GÎMEL*

17 Ji min, qûlê xwe re qenciyê bike ku ez bijîm. Û ez gotina te biparêzim.
18 Çavên min veke ku, ez nuwazeyên di Zagona te de bibînim.
19 Ez li vê dinê xerîb im; emirên xwe ji min veneşêre!
20 Hundirê min diçike, ji ber ku ez her tim bêriya seretayên te dikim.
21 Te kancên bi nalet, yên ji emirên te ve çewt dibin, azirand.
22 Şermezarî û heqaretan ji ser min rake, ji ber ku ez şîretên te digirim.

1 Gotinên Alef, Beyt... navên herfên elfabeya Îbraniyan e. Zebûra 119 helbesteki bi şiklê akrostişê ve hatiye nivisandinê ye.

23 Ger serok bicivin û li dijî min bi xerabî biaxifin jî, lê belê qûlê te qaîdeyên te fikirî.

24 Belê, şahdeyiyên te dilgeşiya min in; ew şîretkirê min in.

*DALET*

25 Canê min bi tozê ve zeliqî; min li gor soza xwe bivejîne!

26 Rêyên xwe ji te re gotim û te bersivê da min; Zagonên xwe hînî min bike!

27 Rêyên qaîdeyên xwe ji min re bêje ku, ez karên te, yên ku mirovan şaş dikin bifikirim.

28 Ji keserê ve canê min duhule; li gor soza xwe min xwurt bike!

29 Ji rêya derewîn min bi dûr bixe û li gor Zagona xwe, dilovaniyê[1] li min bike!

30 Min rêya dilsoziyê bijart, daraziyên te li cîh dîtim.

31 Bi dil bi şahdeyiyên te ve girtim, ya XUDAN; min neşermîne!

32 Gava tu dilê min fireh bikî, ez ê di rêya emirên te de baz bidim.

*HE*

33 Ya XUDAN, hînî min bike ku, ka ez ê çawa li pêy Zagonên te herim û ez ê wê heta dawiyê bigirim.

34 Fêhmkariyê bide min ku, ez Zagona te biparêzim û bi hemûya dilê xwe bi wê bigirim.

35 Di rêya emirên xwe de, min bimeşîne, ji ber ku, ez ji rêya te zewqê digirim.

36 Dilê min ne ber bi qezenca neheq, lê ber bi şahdeyiyên xwe bibe!

37 Çavên min ji tiştên vala[2] ve bizivirîne! Min di rêya xwe de bijîne!

38 Bona ku ji te bê tirsîn; soza ku te dayiye min, qûlê xwe bîne cîh!

39 Ji heqareta ku ez jê ditirsim, min dûr bigire! Ji ber ku seretayên te qenc in.

40 A vay, ez bêriya şertên te dikim! Min li gor dadiya xwe bivejîne!

*VAV*

41 Û bila xêra te bê ser min, li gor soza xwe min xelas bike, ya XUDAN!

42 Wê çaxê ez dikarim, bersiva ku hewce dike; bidim yên ku heqaretê li min dike;
ji ber ku ez bi soza te ewle me.

43 Û gotina rastiya xwe ji devê min ve, bitûmî dernexe, ji ber ku min hêviya xwe bi seretayên te ve girê daye!

44 Û ez ê Zagona te tim û tim, heta bêdawîbûnê bigirim.

45 Û ez ê di firehiyê de bimeşim, ji ber ku min berê xwe da şertên te.

---

1 Kerem, xêr, qencî.

2 Tiştên vala, an ji: Pûtên bêqîmet.

46 Û ez ê li ber qiralan qala
şahdeyiyên te bikim û şerm nekim.
47 Û ez ji emirên te zewqê digi-
rim, ji wan hez dikim.
48 Û ez ê ber bi emirên te ve, yên
ku jê hez dikim, destê xwe bilind
bikim û Zagonên te bifikirim.

*ZAYÎN*

49 Soza ku te dabû qûlê xwe, di
bîr bîne, te bi vê hêviyê da min!
50 Yê dema ku ez êşê dikişînim,
min şa dike ev e, gotina te ez
vejandim.
51 Yên kanc pirr qerfan bi min re
kirin, dîsa jî ji Zagona te ve şaş
nebûm.
52 Min daraziyên te yî te di dema
berê de danî bû, di bîr anî û ez xem-
revînî bûm, ya XUDAN.
53 Ez pirr qehirîm, ji ber xerabên
ku Zagona te terikandine.
54 Zagonên te, ji min re bûn Zebûr,
li vê mala ku ez lê bûme mêvan de.
55 Şevê navê te di bîra xwe de
anîm, ya XUDAN û bi Zagonên
te girtim.
56 Tiştê ku ez dikim, li gor şertên
te çûyîn e.

*HEYT*

57 Yê ku dikeve para min tu yî, ya
XUDAN; gotim ku ez ê gotinên
te bînim cîh.
58 Ez bi hemûya dilê xwe li ber te
geriyam; dilovaniyê li min bike, li
gor gotina xwe!
59 Li ser rêyên ku girtime fi-
kirîm û gavên xwe vergerandim
şahdeyiyên te.
60 Bona li gor emirên te bikim,
destê xwe bi lez girtim û dereng
nemam.
61 Tayên xeraban bi min ve geri-
yan; Zagona te ji bîr nekirim.
62 Bona daraziyên te yî rast, nîvê
şevê radibim û şikiryê ji te re di-
kim.
63 Û ez hevalê hemûyên ku ji te
ditirsin û yên li gor şertên te dikin
im.
64 Ya XUDAN, rûyê erdê bi xêra
te ve tijî; Zagonên xwe hînî min
bike!

*TEYT*

65 Ya XUDAN, te li gor gotina
xwe qenciyê ji qûlê xwe re kir.
66 Rast dîtin û zaniyariyê bide
min! Ji ber ku ez bi emirên te ba-
wer im.
67 Berî ku êşê bikişînim, ji rê ve
derdiketim, lê belê niha li pêy go-
tina te diçim.
68 Tu qenc î û qenciyê dikî; Zago-
na xwe hînî min bike!
69 Yên kanc bi derewan, min ge-
marî kirin; lê belê ez bi hemû dilê
xwe li gor şertên te dikim.
70 Dilê wan mîna rûn qelew bû,
lê belê ez ji Zagona te ve zewqê
digirim.
71 Êş kişandina min qenc bû; ji
ber ku ez hînî Zagonên te dibim.

72 Zagona ku ji devê te derdi-
keve, bona min ji hezaran zêr û
zîvan biqîmetir e.

*YOD*

73 Destên te min afirand û şiklê
dan min, fêhmkariya min ava bike
ku ez hînî emirên te bibim!
74 Bila yên ji te ditirsin, dema
min bibînin, kêfxweş bibin, ji ber
ku hêviya xwe bi gotina te ve girê
dam.
75 Dizanim, ya XUDAN, darazi-
yên te bi dadî ne û te bi dilsoziyê
min nizm kir.
76 Li gor soza ku te daye min,
bila xêra te ji qûlê te re bibe xem-
revînî!
77 Dilovaniyên xwe bişîne min,
ez bijîm, ji ber ku ez ji Zagona te
kêfê digirim.
78 Bila yên kanc, bona ku bi
derewan min tawanbar kirine,
bişermin! Lê ez jî şertên te difi-
kirim.
79 Bila vegerin min, yên ji te di-
tirsin, yên şahdeyiyên te dizanin.
80 Bila dilê min bêqisûr li gor Za-
gonên te bike, ûsa ku, ez şermezar
nebim.

*KAF*

81 Dema ez bêriya xelaskirina te
dikim, canê min diçike, min hêvi-
ya xwe bi gotina te ve girê da.
82 Ronîka çavê min ditefe, ji ber
ku ez li benda tiştên ku te soza
wan daye, pirsa: Tuyê kengê min
xemrevîn bike? dipirsim.
83 Ji ber ez bûm mîna meşka ji
dûhê ve reş bûyî; dîsa jî Zagonên
te ji bîr nakim.
84 Rojên qûlê te çiqas in? Tuyê
kengê daraz bikî, yên ku zulmê li
min kirine?
85 Bona min kortalê kolan, kan-
cên ku li gor Zagona te nakin.
86 Hemû emirên te ewlekar in;
bêheq zulmê li min dikin; alîkari-
yê ji min re bike!
87 Kêm mabû ku min ji rûyê erdê
paqij kiribana; lê belê ez ji şertên
te neqetiyam.
88 Canê min bivejîne, li gor xêra
xwe û ez şîretên ji devê te derdi-
kevin bigirim.

*LAMED*

89 Ya XUDAN, gotina te, li ezma-
nan heta bêdawîbûnê disekine.
90 Dilsoziya te ji nifşeyan heta
nifşeyan didome; rûyê erdê ya ku
te ava kiriye, disekine.
91 Îroj her tiştên ku li gor sere-
tayên te, li ser pêlan disekinin,
ji ber ku her tişt qûlitiyê ji te re
dikin.
92 Ger Zagona te, çavkaniya
kêfa min nebûya, ez ê ji eşên ku
dikişînim, tune bibû ma.
93 Ez tu carî şertên te ji bîr nakim,
ji ber ku te bi wan ve ez vejandim.
94 Min xelas bike, ez yê te me, ji
ber ku berî dame şertên te!

95 Yên xerab, li benda tunekirina min in; lê belê ez lêgerîna şahdeyiyên te dikim.
96 Dawiya her tiştê bêqisûr dîtim, lê belê emrê te sînorê nas nake.

*MEM*

97 Ez çiqas ji Zagona te ve hez dikim! Di hemûya rojê de li ser wê difikirim.
98 Emirên te, min ji neyarên min ve bi zaniyar kirin, ji ber ku ew her tim bi min re ne.
99 Ez ji hemû mamosteyên xwe ve baqiltir im, ji ber ku şahdeyiyên te fikrê min in.
100 Ez ji kalepîran ve zaniyartir im, ji ber ku li gor şertên te dikim.
101 Lingên xwe ji her rêya xerab ve diparêzim; bona ku soza te bigirim.
102 Ez ji daraziyên te venegeriyam; ji ber ku te hînî min kir.
103 Sozên ku te dane, ji pidûya min re çiqas şêrîn tên; bona devê min ji hungivan şêrîntir in!
104 Ez li pêy şertên te çûyînê ve zaniyariyê qezenc dikim; bo vêya, ji her rêya çewt ve dikerihim.

*NÛN*

105 Gotina te bona gavên min çira û bona rêya min ronahî ye.
106 Sondê xwarim ku ez ê li pêy daraziyên te yî dadî biçim û ez ê sonda xwe bigirim.
107 Zehf tengasiyê kişandim, ya XUDAN; li gor soza xwe, min bivejîne!
108 Pesnahiyên ji dil yên ku ji devê min derketine, qebûl bike, ya XUDAN û seretayên xwe hînî min bike!
109 Jiyana min, her tim di xeterê de ye; dîsa jî Zagona te ji bîr nakim.
110 Yên xerab, bona min dafikê ava kirin, dîsa jî ji kirina şertên te çewt nebûm.
111 Şahdeyiyên te, heta bêdawîbûnê mêrasa min in, ew kêfxweşiyên dilê min in.
112 Ez bi biryar im, ku heta bêdawîbûnê ez ê li gor qaîdeyên te bikim.

*SAMEK*

113 Ez ji zilamên du dilî dikerihim û ji Zagona te hez dikim.
114 Sitargeh û mertalê min tu yî; ez hêviya xwe bi gotina te ve girê didim.
115 Ya yên xerab, ji min dûr bisekinin: Ku ez emirên Xwedayê xwe bînim cih.
116 Li gor soza xwe piştgiriyê ji min re bike, ez jiyanê bibînim û hêviya min vala dernexe!
117 Bi hijdîn bi min re bigire, ez xelas bibim û her tim bala xwe bidim Zagonên te.
118 Te her kesê ku ji Zagonên te derdikevin, red kirin, ji ber ku hîleyên wan vala ne.

119 Tu xerabên li dinê, mîna
kewaşeyan davêje; bo vêya ez ji
şahdiyiyên te hez dikim.
120 Bedena min ji toqîna te dile-
rize û ez ji daraziyên te ditirsim.

*AYÎN*

121 Ya bi dad û rast kirim; min bi
destê xedaran ve bernede!
122 Bona qenciyê, ji qûlê xwe re
bibe kefîl; bila yên kanc zordesti-
yê li min nekin.
123 Ronîka çavê min ditefe, ji ber
ku ez li benda te me, ku tu min
xelas bike û soza xwe yî dadî bîne
cîh.
124 Li gor xêra xwe, ji qûlê xwe
re bike û Zagonên xwe hînî min
bike.
125 Ez qûlê te me, aqil bide min
ku, ez şahdeyên te fêhm bikim.
126 Wexta ku XUDAN bikarbîne
ye; Zagona te dicûn.
127 Bo vê yekê ez emirên te, ji
zêran û zêrên safî zêdetir hez di-
kim.
128 Bo vê yekê, ez hemû şertên
ku te daniye rast dibînim; ji her
rêya çewt dikerihim.

*PE*

129 Şahdeyên te, tiştên ku şaş û
metal dihêline; bo vê yekê, ez bi
dil û can li pêy wan diçim.
130 Daxuyanî kirina gotinên te,
ronahiyê diweşîne; aqilê dide mi-
rovên saf.
131 Devê min vekirî, ez bi xize
xiz im; ji ber ku bêriya emirên te
dikim.
132 Berê xwe vegerîne min û bi
xêrê li min binihêre; mîna ku tu
her tim li yên ji navê te hez dikin
re dinêrî!
133 Li gor soza ku te daye, gavên
min bizexmîne û bila tu sûc nebe
serwerê min.
134 Min ji zordestiya mirovan
ve xelas bike û ez li gor şertên te
bikim.
135 Bila wecê te, ronahiyê li ser
qûlê te biweşîne û Zagonên xwe
hînî min bike.
136 Mîna baranê hêsir ji çavên
min diherikin; ji ber ku li pêy Za-
gona te naçin.

*SADE*

137 Tu bi dad î, ya XUDAN û da-
raziyên te rast in.
138 Şahdeyiyên ku te emir dane
rast û bitûmî ewlekar in.
139 Xîreta min, min qedand, ji
ber ku neyarên min, gotinên te ji
bîr kirin.
140 Soza te pirr ewlekar e û qûlê
te ji wê hez dike.
141 Ez yekî ne girîng û xor tê
dîtin im; lê belê şertên te ji bîr
nakim.
142 Dadiya te heta bêdawîbûnê
rast e û Zagona te rasteqîn e.
143 Ez ketim tengasî û bêhntengi-
yê; lê belê emirên te kêfa min in.

144 Şahdeyiyên te heta bêdawîbûnê rast in; aqil bide min ku, ez bijîm.

*KOF*

145 Ez bi hemûya dilê xwe diqêrim, bersivê bide min, ya XUDAN! Ez ê li gor Zagonên te bikim.
146 Bangî te kirim, min xelas bike û ez ê li pêy şahdeyiyên te herim.
147 Berî zayîna berbangê, ez radibim û alîkariyê dixwazim û bi gotina te ve hêviya xwe girê dam!
148 Bona li ser soza ku te daye bifikirim; heta sibehê xew nakeve çavên min.
149 Ji ber xêra xwe guh bide dengê min, ji ber seretayên xwe, ya XUDAN, min bivejîne!
150 Yên li pêy xerabiyê baz didin, nêzîk dibin; ji Zagona te ve dûr dikevin.
151 Lê belê tu nêzîk î, ya XUDAN û hemû emirên te rast in.
152 Ji zû ve ji şahdeyiyên te fêhm kirim ku, te wan ji abadîn ve ava kiriye.

*REŞ*

153 Tengasiya ku ez dikişînim bibîne, min xelas bike! Ji ber ku Zagona te ji bîr nekirim.
154 Doza min biparêze û min azad bike! Li gor soza xwe, min bivejîne.
155 Xelasî li dûrî xeraban e, ji ber ku li Zagonên te nagerin.
156 Tu pirr dilovan e, ya XUDAN, li gor seretayên xwe, min bivejîne.
157 Yên ku zulmê li min dikin û neyarên min pirr in; dîsa jî ji şahdeyiyên te ve neqetiyam.
158 Ez bi îkrahê ve li xayînan dinêrim; ji ber ku li pêy soza te naçin.
159 Binêre, ez çiqas ji şertên te hez dikim; ji bo xêra xwe, ya XUDAN, min bivejîne!
160 Bingeha gotinên te rastî ye û dê hemûya seretayên te yî rast heta bêdawîbûnê bidomin.

*SÎN Û ŞÎN*

161 Serokan, bêsedem zulmê li min kirin; lê belê dilê min ji gotina te ditirse.
162 Mîna zilamê ku pirr xenîmetê dîtiye, ez bi gotina te kêfxweş dibim.
163 Dikerihim, erjengî dibim ji derewan; lê belê ji Zagona te hez dikim.
164 Bona seretayên te yî rasteqîn, rojê heft caran pesnê te didim.
165 Yên ji Zagona te hez dikin, dilxweşiya mezin dibînin û qet tiştek wan nalerizîne.
166 Ya XUDAN, bi xelaskirina te hêviya xwe girê dame û emirên te anîm cîh.

167 Canê min şahdeyiyên te
paristin û zehf ji wan hez dikim.
168 Ez şîretên te û şertên te tînim
cîh, ji ber ku hemû rêyên min li
ber te ne.

*TAV*

169 Bila qêrîna min bigihêje te,
ya XUDAN;
li gor soza xwe fêhmkariyê bide
min!
170 Bila lavayên min bigihêjin te;
li gor soza ku te daye, min xelas
bike!
171 Bila ji lêvên min pesnahî bi-
herikin, ji ber ku te Zagonên xwe
hînî min kirin.
172 Bila sozên te, di zimanê min
de bideng bibin, ji ber ku hemû
emirên te rast in.
173 Bila destê te, bona alîkariya
min amade be! Ji ber ku şertên te
bijartim.
174 Ez bêriya xelaskirina te di-
kim,
ya XUDAN û Zagona te çavkani-
ya zewqa min e.
175 Canê min bivejîne, dê ew ê
pesnahiya te bike û bila seretayên
te bibe alîkarê min!
176 Ez mîna mîha ku winda bûyî
eware digerim;
li qûlê xwe bigere! Ji ber ku
emirên te ji bîr nekirim.

**Zebûr 120**

1 Qesîda Hecê[1]. Dema ketim ten-
gasiyê, bangî XUDAN kirim û wî
bersivê da min.
2 Ya XUDAN, canê min ji lêvên
derewkir û ji zimanên ku xapînok
in ve xelas bike!
3 Ya zimanê xapînokî, çi ji te re
bê dayîn û dê hîn çi ji te re bê zêde
kirin?
4 Tîrên tûj, yên egîd û pêtên ji
agirê hejikê gîhagêskê!
5 Wey li min, mîna ku li Meşekê
tenê mabim, di nava çadirên Ke-
darê de rûniştibim!
6 Canê min demekî dirêj, di nava
yên ku ji aşîtiyê ve dikerihin, ma.
7 Ez alîgirtê aşîtiyê me; lê belê,
gava dest bi gotinê dikim, ew
bona şer kirinê radibin.

**Zebûr 121**

1 Qesîda Hecê. Ez çavên xwe ra-
dikim çiyan, dê ji ku ve bona min
alîkarî bê?
2 Alîkariya min, ji XUDANê ku
erd û ezman afirandiye ve tê!
3 Ew bona şemitandina lingên te
destûrê nade, yê ku te diparêze,
xewar nabe.
4 Parazkirê Îsraêlê ne radikeve ne
jî xewar dibe.
5 Parazkirê te XUDAN e. XUDAN
li aliyê te yî rastê, ji te re sî ye.

---

[1] Qesîda Dawid ya Hecê: Dema mirov, bona pîroz kirina Cejna nanê şikeva (fisih), candin û cardaxê diçûn Orşelimê, vê murxê digotin.

6 Bi rojê tav, bi şevê jî heyv nika-
re ziyanê bide te.
7 XUDAN, te ji her xerabiyê ve
diparêze, ew canê te diparêze.
8 Ji niha ve heta bêdawîbûnê dê
XUDAN derketin û ketina[1] te bi-
parêze.

**Zebûr 122**

1 Qesîda Dawid ya Hecê. Her
ku ji min re: Ka em herin mala
XUDAN! hate gotin, ez kêfxweş
bûm.
2 Lingên me di deriyên te de dise-
kinin; ya Orşelîm!
3 Orşelîm, tu mîna bajarekî pev re
hatiye avabûn e!
4 Eşîr derdikevin wir, eşîrên XU-
DAN, li gor Zagona ku ji Îsraêlê
re hatiye dayîn, bona ku şikiryê ji
navê XUDAN re bikin!
5 Ji ber ku li wir textên darazi-
yê, textên mala Dawid hatine ava
kirin.
6 Dilxweşiyê ji Orşelîmê re bi-
xwazin: Bila yên ku ji te hez dikin
aramiyê bibînin!
7 Bila di bircên te de dilxweşî,
di qesrên te de aramî bibe ser-
wer!
8 Bona birayên min, hevalên min,
bila dilxweşî ji te re be! dibêjim.
9 Bona mala Xwedayê me
XUDAN, qenciyê ji te re dixwa-
zim.

**Zebûr 123**

1 Qesîda Hecê. Çavên xwe ber bi
te ve radikim, ya yê ku li ezmanan
rûdinê!
2 Çawa çavên qûlan li destê efen-
diyên xwe, çavên xizmetkaran li
yê xanima xwe binêrin,
çavên me jî li XUDAN, Xwedayê
me ûsa dinêrin, heta ku heyfa wî
li me bê.
3 Bila heyfa te li me bê, ya XU-
DAN, bila heyfa te bê! Bi heqa-
retên ku dîtine, em têr bûne.
4 Bi qerfên yên di rehetiyê de
dijîn, heqaretên kanca, zehf têra
canê me kir!

**Zebûr 124**

1 Qesîda Dawid ya Hecê. Ger
XUDAN ne li aliyê me ba, bila
niha Îsraêl bibêje:
2 Ger XUDAN ne li aliyê me ba,
dema mirovan êrîşî me kirin,
3 Wê wextê, dê wan me bi saxî
daqurtandina, dema hêrsa wan li
dijî me sor bû.
4 Wê demê avê li ser me bigirta-
na, şêlavan ji ser canê me ve der-
bas bibûna.
5 Wê demê avên qurre, ji ser canê
me ve derbas bibûna.
6 Bila pesnahî bibin, ji XUDANê
ku me ji diranên wan re nekiriye
êm!
7 Mîna civîkekî, canê me ji dafika
nêçîrvanan xelas bû:
dafik şikiya û em xelas bûn!

1 Çûyin û hatin.

8 Alîkariya me di navê XUDANê
ku erd û ezman afirandiye de ye.

**Zebûr 125**

1 Qesîda Hecê. Yên ku bi XU-
DAN ve bawer dibin, mîna Çi-
yayê Siyonê ne, ku nalerize, heta
bêdawîbûnê dimîne.
2 Çiyan çawa dora Orşelîmê gir-
tibin, XUDAN jî ûsa bi gelê xwe
girtiye, ji niha, heta bêdawîbûnê.
3 Ji ber, bona ku yên rast destê
xwe direjî fesadan nakin, çoyê
xerabiyê li ser nisîbê rastan na-
sekine.
4 Qenciyê bike, ya XUDAN, ji
qencan û yên ku dilê wan paqij
in re!
5 Lê belê yên ku berî dane rêyên
çewt, dê XUDAN, wan bi ne-
tewên xerab re biqewirîne. Bila
dilxweşî ji Îsraêlê re be!

**Zebûr 126**

1 Qesîda Hecê. Dema XUDAN
yên sirgûn şunda anî Siyonê[1], ji
me re mîna xewnekê hat.
2 Wê demê devê me bi kenê û zi-
manê me bi murxên kêfxweşiyê
ve tijî bû. Wê demê, bi gotina:
XUDAN, bona wan karên mezin
çêkir! Di nava neteweyan de hate
axaftin.
3 XUDAN bona me karên me-
zin çêkir; bona vêya em kêfxweş
bûn!
4 Ya XUDAN, sirguniya me
şunda vegerîne, mîna çemên di
Negebê de!
5 Yên di nava hêstirên çavan de
çandine, dê bi gotina murxên
kêfxweşiyê ve biçînin.
6 Yê ku tova ku dê biçîne
dikişîne û digirî û diçe, helbet
dê bi kişandina demetên xwe, bi
kêfxweşiyê ve were.

**Zebûr 127**

1 Qesîda Silêman ya Hecê. Ger
XUDAN xanî çêneke, hoste bi
tahbekî vala dixebitin.
Ger XUDAN bajêr neparêze,
notirvan, bêfêde hişyar disekine.
2 Hûn bêsedem zû radibin, de-
reng radikevin. Ya kesên ku nanê
bi zehmet ve hatiye qezenc kirin
dixwin, XUDAN ji hezkirên xwe
re, di xewê de dide.
3 Zarok, mêrasa ku XUDAN dide
ne, xelatekî dexla rehmê ye.
4 Tîr di destê egîd de çawa be,
lawên di ciwaniyê de diwelidin jî
ûsa ne.
5 Xwezî li mirovê ku tîrdanka
wî, bi wan ve tijî ye! Dema di
darazxanê de[2], bi neyarê xwe ve

---

[1] Dema XUDAN yên sirgûn şunda anî Siyonê; an jî: Dema XUDAN Siyonê gîhand rewşa wê yî kevin.

[2] Di darazxanê de: Bi Îbranitî di deriyê bajêr de. Di demên kevin de darazî, di deriyê bajêr de dihat çêkirin.

têkevin guftegoyê, dê şermezar nebin.

**Zebûr 128**

1 Qesîda Hecê. Xwezî li her zilamê ku ji XUDAN ve ditirse, yê di rêya wî de dimeşe!
2 Ji ber ku, tuyê dexla keda xwe bixwe, tuyê kêfxweş û serfiraz bibe.
3 Dê pîreka te, di mala te de bibe mîna mêwekî bi berdar; zarokên te, li dora sifra te dibin mîna şivên zeytûnê.
4 A vay, kesê ku ji XUDAN ve bitirse, dê bi vî awayî bê pîroz kirin.
5 Bila XUDAN te ji Siyonê ve pîroz bike! Xwezîka tu dewlemendiya Orşelîmê bibînî,
di hemûya jiyana xwe de!
6 Û xwezîka tu zarokên zaroyên xwe bibînî! Bila dilxweşî ji Îsraêlê re be!

**Zebûr 129**

1 Qesîda Hecê. Ji ciwaniya min ve nêz bi nêz êrîşî min kirin; bila
niha Îsraêl bibêje: 2 Ji ciwaniya
min ve nêz bi nêz êrîşî min kirin; lê belê wan, min bindest nekirin.
3 Cotkaran di pişta min de gîsin ajotin, şopek zehf dirêj kirin.
4 Lê belê XUDAN bi dadî ye; benên xeraban jê kir.
5 Hemû kesên ku ji Siyonê dikerihin, bila di nava şermezariyê de şunda vegerin!
6 Bila vegerin gîhayê li ser xanî, gîhayê hîn mezin nebûye, ziwa bûyî.
7 Daskêş lepê xwe, demedvan himbêza xwe bi wê danagire.
8 Û yên ku ji rêgehê ve derbas bibin jî, nabêjin: Bila bereketa XUDAN li ser we be!
Em we bi navê XUDAN pîroz dikin!

**Zebûr 130**

1 Qesîda Hecê. Ez ji kûraniyan ve bangî te dikim, ya XUDAN!
2 Dengê min bibihîze, ya Xudan! Qenc guh bide lavayên min!
3 Ya XUDAN, ger tu hisabê sûcan bigire: Ma dê kî li ser pêlan bimîne, ya Xudan?
4 Lê belê tu efûkir î, ûsa ku, bila ji te ve bê tirsîn.
5 Ez li hêviya XUDAN im, canê min li bendê ye û ez hêviya xwe bi gotina wî girê didim.
6 Ji yên çavnêriyê li sibê dikin, belê, ji yên ku çavnêriyê li sibê dikin hîn jî zêde, canê min çavnêriyê li Xudan dike.
7 Ya Îsraêl, hêviyê bi XUDAN ve girê bide! Ji ber ku li cem XUDAN xêr û xelasiya bitûmî heye.
8 Û ew, Îsraêlê ji hemû fesadiyên wê ve xelas bike.

**Zebûr 131**

1 Qesîda Dawid ya Hecê. Ya XUDAN! di dilê min de xirûr nîne

û çavê min ne li bilindahiyan e
û ez bi karên mezin û bi karên
nuwazeyên ku min derbas dikin
naştexilim.
2 Li dijî vêya, mîna zarokê di
himbêza dayikê de ji şîr ve hati-
ye qut kirin, ma canê min xwe şa
nekir û aramiyê nedît? Canê min
di min de bû mîna zarokê ji şîr ve
hatiye qut kirin.
3 Ya Îsraêl, hêviyê bi XUDAN
ve girê bide, ji niha, heta bê-
dawîbûnê!

**Zebûr 132**

1 Qesîda Hecê. Ya XUDAN, Da-
wid û hemû zebûniyên wî di bîr
bîne!
2 Çawa sondê ji te re xwar û ji
Xwedayê xwurt yê Aqûp re çawa
qewl kir:
3 Ez ê neçim mala xwe û dirêjî
nava livînê xwe nebim.
4 Û dê xew nekeve çavên min,
pêlûyên çavên min neyên girtin.
5 Heta ku ji XUDAN re cîhek
û xaniyek ji Xwedayê xwurt yê
Aqûp re nebînim!
6 Me bihîstin ku Sindoqa Pey-
manê li Efratê ye, me wê li qirên
Yaarê dîtin.
7 Em bikevin warên wî, li ber
kursiya ku lingê xwe sipartiyê bi-
peristin! gotin.
8 Derkeve, ya XUDAN, cîhê ku
tuyê lê bijî, bi Sindoqa ku nîşana
hêza te ye!
9 Bila rastiya kahînên te, bê li xwe
kirin û qûlên te yî dilsoz qêrînên
kêfxweşiyê bavêjin!
10 Bona xatirê qûlê xwe Dawid,
wecê xwe ji qiralê ku te mesh ki-
riye venegerîne!
11 XUDAN ji Dawid re sondek bi
biryar xwar, ji sonda xwe venage-
re: Ez ê yekî ji nîjada te, di textê
te de bidim rûniştin.
12 Ger lawên te li gor peymana
min, li gor şîretên ku bidim bikin,
dê lawên wan jî heta bêdawîbûnê,
li texta te rûnin.
13 Ji ber ku XUDAN Siyonê bi-
jart, xwest ku wir ji xwe re bike
xanî: 14 Cîhê ku heta bêdawîbûnê
ez lê bijîm ev e got, ez ê li vir rû-
nim, ji ber ku vêya xwestim.
15 Ez ê erzaxê wê, zehf bi bereket
bikim, xizanên wê bi xwarinan ve
têr bikim.
16 Û kahînên wê bi xelasiyê ve
bixemilînim û qûlên wê yên dil-
soz, bideng murxên kêfxweşiyê
bibêjin.
17 Ez ê li vir, ji nîjada Dawid qi-
ralekî xwurt derxînim, çirayekê
bona Mesîhê xwe ava kirim.
18 Ez ê neyarên wî bi şermezariyê
ve bixemilînim, lê belê dê taca di
serê wî de bibiriqe.

**Zebûr 133**

1 Qesîda Dawid ya Hecê. Çi qenc
û çi xweş e, bi hev re rûniştina bi-
rayan!

2 Mîna rûnê bi qîmet, yê di serî
de tê dayîn, mîna rûnê ji rî, riya
Harûn ve diherike û dadikeve
berstûyê qeftanê wî ye.
3 Xunava dibare çiyayê Her-
monê, wekî bibare çiyayên Si-
yonê; ji ber ku XUDAN li wir
emrê bereketê û heta bêdawîbûn-
an jiyanê da.

**Zebûr 134**

1 Qesîda Hecê. Ya hûn, hemû qûlên
XUDAN, yên bi şevê xizmetê ji
Perestgeha XUDAN re dikin, pes-
nahiyan pêşkêşî XUDAN bikin!
2 Destên xwe ber bi cîhê Pîroz
rakin û pesnahiyan pêşkêşî XU-
DAN bikin!
3 XUDANê ku ezman û erd
afirandiye, bila te ji Siyonê ve
pîroz bike!

**Zebûr 135**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]! Pesnahiyan pêşkêşî navê
XUDAN bikin,
ya qûlên XUDAN!
2 Ya hûn, yên di Perestgeha XU-
DAN de, di hewşên Perestgeha
Xwedayê me de xizmetê dikin,
pesnahiyan pêşkêş bikin!
3 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin! ji ber ku XUDAN qenc e.
Pesnahiya navê wî bi Zebûran ve
bidin, ji ber ku ev xweş e.
4 Ji ber ku, XUDAN ji xwe re
Aqûp û bi gelê xwe yî heq ve ji
Îsraêlê bijart.
5 Ji ber ku dizanim, XUDAN me-
zin e û Xudanê me ji hemû îlahan
ve bilindtir e.
6 XUDAN çi bixwaze, dikare bike,
di ezmanan de, di rûyê erdê de, di
behran de, di hemû kûritiyan de.
7 Ji çar hawirdorê rûyê erdê ve
helmê bilind dibe, bona baranê
birûskan dide avêtin, ji embarên
xwe ve bayê derdixe.
8 Ji mirovan heta heywanan,
hemûyên li Misirê pêşiyê welidî-
ne kuşt.
9 Ya Misir, di navenda te de, ji
Fîrawûn û hemû wezîfedarên wî
re, nîşanan, karên dide şaş kirin
da xuya kirin.
10 Neteweyên mezin rastî xera-
bûnê bir û qiralên xwurt kuşt;
11 Qiralê Amorê Sîhon û qiralê
Başanê Og û hemû qiralên Kenanê.
12 Û erdên wan bi mêrasî, belê,
erdên wan bi mêrasî da gelê xwe
Îsraêlê.
13 Ya XUDAN, dê navê te, heta
bêdawîbûnê bidome, ya XUDAN,
hemûya nifşeyan jî, dê te di bîra
xwe de bînin!
14 Ji ber ku XUDAN daraziyê
ji gelê xwe re dike û dilovaniyê
nîşanî qûlên xwe dide.
15 Pûtên netewan, ji zêr û zîvê
hatine çê kirin; berhemên destê
mirovan e.

---

1 Halelûya!

16 Devê wan hene û nikarin bi-
axifin; çavên wan hene û nabînin;
17 Guhên wan hene û nabihîzin;
hilmê jî nastînin û nadin.
18 Hemûyên wan çê kirine û yên
bi wan ewle dibin, dê bibin mîna
wan!
19 Ya mala Îsraêlê, pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bikin! Ya mala
Harûn, pesnahiyan pêşkêşî XU-
DAN bikin!
20 Ya mala Lêwî, pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bikin! Pesna-
hiyan pêşkêşî XUDAN bikin, ya
yên ji XUDAN ve ditirsin!
21 XUDANê ku li Orşelîmê rû-
dine, bila ji Siyonê ve pîroz bibe!
Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]!

## Zebûr 136

1 Ji XUDAN re şikiryê bikin! ji
ber ku ew qenc e; ji ber ku xêra
wî bêdawî ye!
2 Şikiryê bikin ji Xwedayê xwe-
dayan[2] re, ji ber ku xêra wî bê-
dawî ye!
3 Ji Xudanê xudanan re şikiryê
bikin! Ji ber ku xêra wî bêdawî ye!
4 Ji yek hebûna ku hemû nuwa-
zeyan çê dike re, ji ber ku xêra wî
bêdawî ye!
5 Ji yê ku ezmanan bi zaniyarî
afirandiye re, ji ber ku xêra wî bê-
dawî ye!
6 Ji yê ku erdê li ser avan belav
kiriye re, ji ber ku xêra wî bêdawî
ye!
7 Ji yê ku şewleyên mezin afiran-
diye re, ji ber ku xêra wî bêdawî
ye!
8 Yê ku tavê, bona daraziya rojê,
ji ber ku xêra wî bêdawî ye!
9 Bona ku şevê bibe serwer heyv
û sitêrkan afirandiye re, ji ber ku
xêra wî bêdawî ye!
10 Ji yê ku, li Misirê yên pêşîn
zayîne kuştiye re, ji ber ku xêra
wî bêdawî ye!
11 Yê ku bi destê xwe yî xwurt û
bi baskê xwe yî biqudret re, ji ber
ku xêra wî bêdawî ye!
12 Yê ku Îsraêlê ji Misirê derxisti-
ye re, ji ber ku xêra wî bêdawî ye!
13 Yê ku behra sor kiriye du parî
re, ji ber ku xêra wî bêdawî ye!
14 Û yê ku Îsraêlê di nava wê de
derbas kiriye re, ji ber ku xêra wî
bêdawî ye!
15 Û ji yê ku Fîrawûn û artêşa wî
rijandiye behra sor re, ji ber ku
xêra wî bêdawî ye!
16 Yê ku gelê xwe di çolê de daye
meşandinê re, ji ber ku xêra wî
bêdawî ye!
17 Yê ku li qiralên mezin xistiye
re, ji ber ku xêra wî bêdawî ye!
18 Û yê ku qiralên bi nav û deng
kuştiye re, ji ber ku xêra wî bê-
dawî ye!

[1] Halelûya!

[2] Îlahan.

19 Qiralê Amoriyan Sîhon, ji ber
ku xêra wî bêdawî ye!
20 Û yê ku qiralê Başanê Og kuş-
tiye re, ji ber ku xêra wî bêdawî ye!
21 Û bila li yê ku erdên wan bi
mêrasî, ji ber ku xêra wî bêdawî
ye!
22 Daye qûlê xwe Îsraêlê re, ji ber
ku xêra wî bêdawî ye!
23 Bila ji yê ku di roja me yî ten-
gasiyê de me di bîr tîne re, ji ber
ku xêra wî bêdawî ye!
24 Û ji yê ku me ji neyarên me ve
xelas kiriye re, ji ber ku xêra wî
bêdawî ye!
25 Yê ku xwarinê dide hemûyên
bicanan re, ji ber ku xêra wî bê-
dawî ye!
26 Ji Xwedayê ezmanan re şikiryê
bikin! ji ber ku xêra wî bêdawî ye!

**Zebûr 137**

1 Em li qeraxa çemên Babîlê
rûniştin û her ku Siyonê di bîr
anîn, em giriyan.
2 Li darên bî yên li dorê ne, me
lîrên xwe daliqandin.
3 Ji ber ku yên me li wir girtine,
ji me murxan, yên zilmê li me di-
kin, ji me şahiyê dixwestin: Mur-
xekî ji murxên Siyonê ji me re
bistirên! digotin.
4 Em çawa dikarin murxa XU-
DAN bistirên di axa biyanan de?
5 Ya Orşelîm, ger ez te ji bîr bikim,
bila destê minî rastê hunerê xwe ji
bîr bike!
6 Ger te di bîr neynim, Orşelîmê
di ser kêfxweşiya xwe yî herî me-
zin ve negirim, bila zimanê min bi
pidûyê min ve bizeliqe!
7 Ya XUDAN, li dijî lawên Edom,
yên ku digotin: Wê xera bikin,
xera bikin, heta bingehên wê!
Roja Orşelîmê di bîr bîne!
8 Ya tu, bajarê Babîlê ya ku xwe-
zîka xera biba, xwezî li yê ku
tiştên te bi me kiriye, bide te!
9 Xwezî li mirovê ku dê zarokên
te bigire û di zinaran de biperçi-
qîne!

**Zebûr 138**

1 Zebûra Dawid e. Ez bi hemûya
dilê xwe ve şikiryê ji te re dikim,
li ber îlahan pesna te bi qesîdeyan
ve didim!
2 Ez ber bi perestgeha te yî pîroz
ve xwar dibim, şikiryê ji navê te
re dikim û bona xêr û dilsoziya te,
ji ber ku te gotin û navê xwe ji her
tiştî sereta girt.
3 Roja ku bangî te kirim, te bersi-
vê da min; te min bi metirsî kir û
canê min xwurt bû.
4 Hemû qiralên erdê dê şikiryê ji te
re bikin, ya XUDAN; ji ber ku go-
tinên ji devê te derketine bihîstin.
5 Û dê rêyên XUDAN bi qesîde-
yan bistirên; ji ber ku bilindahiya
XUDAN mezin e.
6 Ger XUDAN bilind be jî, çav-
nêriyê li dilnizman ve dike û kan-
can ji dûr ve dinase.

7 Ger ez bikevim tengasiyê, tu
min divejînî û li hemberê hêrsa
neyarên min dest hildidî û destê
te yî rastê min xelas dike.
8 XUDAN bona min her tiştî dike.
Xêra te bêdawi ye, ya XUDAN;
karê destê xwe bernede!

**Zebûr 139**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ya XUDAN! Te bi ceri-
bandinê ve min nas kir.
2 Tu bi rûniştin û rabûna min ve
dizane, tu ramanên min ji dûr ve
fêhm dikî.
3 Tu rêya min û cîhê ku lê radi-
kevim ji hev cuda dikî û tu hemû
rêyên min qenc dizanî.
4 Ji ber ku hîn gotinê negirtibûm
devê xwe, tu bi her tiştên ku ez ê
bibêjim dizane, ya XUDAN.
5 Te hemûya dora min girt û destê
xwe danî ser min.
6 Ez nikarim zanîneki ûsa hilgirim.
pê nikarim, nikarim bigihêjim!
7 Ma ez dikarim herim ku ji ber
ruhê te û dikarim birevim ku ji ber
wecê te?
8 Ger ez derkevim ezmanan, tu li
wir î û livînan li warê miriyan ra-
xim, dîsa jî tu li wir î.
9 Ger ez bazikên berbangê bigi-
rim û bifirim, herim ji behrê wê
de bisekinim,
10 Heta li wir jî, dê destê te rê
nîşanî min bide û dê destê te yî
rastê bi min bigirî.
11 Ger ez bibêjim ku: Bila tarî
min buxumîne û ronahiya ku li
dora min e, vergere şevê.
12 Tarî jî bona te tarî nayê hesi-
bandin û şev, mîna rojê şewle
dide, tarî û ronahî bona te yek e.
13 Ji ber ku te gurçikên min
afirand, te min di zikê dayika min
de hûnand.
14 Ez pesnahiyan pêşkêşî te di-
kim, ji ber ku ez bi qencî û nuwa-
żeyî hatime afirandin.
Çi karên te yî nuwaze hene! Û
canê min bi vêya, qenc dizane.
15 Dema li cîhê bi dizî hatim
afirandin û di kûritiyên rûyê erdê
de hatim hûnandin; bedena min ji
te ne veşartî bû.
16 Hîn ez di cîhê dolê de bûm,
çavên te min dîtin û hîn rojên ku
bona min hatibûn bijartin qet yek
jî nehatibûn; hemû li pirtûka te
hatibû nivîsandin.
17 Ramanên te yên bo min, çiqas
bi qîmet in, ya Xwedê! Hejmarên
wan çiqas zêde ne!
18 Gava ez dest bi jimartinê bikim,
ji hebikên qûmê ve zêdetir in.
Hişyar dibim û hîn bi te re me.
19 Ya Xwedê, xwezîka tu xeraban
bikuje! Ya mirovên destên wan bi
xwîn, dûrî min herin!
20 Ji ber ku bo te bi xerabî diaxi-
fin, neyarên te, navê te bi xerabî
dibêjin.
21 Ya XUDAN, ez çawa nekeri-
him, ji yên ku ji te dikerihin? Û

çawa nekesirim ji yên ku serî li te
hildidin?
22 Ez bi tûmî ji wan dikerihim;
ew ji bo min bûn neyar.
23 Ya Xwedê, li min binêre û dilê
min binase, min biceribîne û hînî
xemên min bibe!
24 Û binêre, ka di min de rêya xe-
rabiyê heye û di jiyana bêdawî de
pêşengiyê ji min re bike!

**Zebûr 140**

1 Bona serekê mûsîkê. Zebûra
Dawid e. Ya XUDAN, min ji mi-
rovê xerab ve xelas bike, ji zor-
dest ve biparêze!
2 Ew di dilên xwe de pêşniyara
xerabiyê dikin, her tim şer û pev-
çûnê dikişkişînin.
3 Mîna maran zimanên xwe tûj
dikin; di bin lêvên wan de jahra
koremaran heye. (Sela.)
4 Ya XUDAN, min ji destê yê
xerab veşêre, ji zilamê zordest
min biparêze; ew ku, pêşniyarê li
çewtkirina gavê min dikin!
5 Yên kanc, bona min dafikê ava
kirin, rêbiran tor şidandin, bona
min feqê danîn qeraxa rê. (Sela.)
6 Ez ji te re dibêjim, ya XUDAN:
Xwedayê min tu yî! Guh bide la-
vaya min, ya XUDAN!
7 Ya Xudanê min XUDAN, xe-
laskerê minî xwurt, te di roja şer
de serê min parast.
8 Xwestekên xeraban nîne cîh, ya
XUDAN, pêşniyarên wan, pêş ve
nebe! Ya na dê ber bi xirûra xwe
bikevin. (Sela.)
9 Bila serê yên ku dora min gir-
tine, fesadiya ku ji lêvên wan
diweşe, bigire!
10 Bila pêtên sor li ser wan ve biba-
re! Bi agir û avên kûr ve bên avêtin,
bila carekî din nekaribin rabin!
11 Yê îftirakir di welêt de tune
dibe; bona ku zordest tune bibe,
dê asîw nêçîra wî bike!
12 Ez dizanim, XUDAN doza
belengazan diparêze, xizanan bi
heq derdixe.
13 Bê şik, dê yên rast şikirye ji
navê te re bikin; dê yên durist li
ber te rûnin!

**Zebûr 141**

1 Zebûra Dawid e. Ez bangî te di-
kim, ya XUDAN! Bona alîkariya
min baz bide! Dema li ber te dige-
rim, guh bide dengê min!
2 Dua min, bila mîna buxura li
pêşiya te bilind dibe, dest vekiri-
na min mîna pêşkêşiya êvarê qe-
bûl bibîne!
3 Ya XUDAN, nobedarekî têxe
devê min, deriyê lêvên min bi-
parêze!
4 Bila dilê min, meyla ber bi xe-
rabiyê nede xuya kirin, ez bi zi-
lamên ku fesadiyê dikin re xera-
biyê nekim û xwarinên wanî herî
xweş tahm nekim!
5 Ger mirovê rast li min bixe; ev
qencî tê hesibandin û ger bi min

bixeyide, mîna rûnê li seriyan
dike ye; serê min wî red nake[1], ji
ber ku duaya min, tim û tim li dijî
xeraba ye.
6 Dema serokên wan, ji zinaran
ve bên avêtin; dê guhdariyê li go-
tinên min bikin; ji ber ku şêrîn in.
7 Mîna zeviyê hatiye ajotin û
qelişandin, hestiyên me ûsa ber bi
devê goristanê belav bûne.
8 Lê belê çavê min li te ne, ya
Xudanê min XUDAN, ez xwe
disipêrim te, min bê parastin
nehêle!
9 Ji dafika ku ava kirine, min bi-
parêze û ji feqên sûckiran min bi-
parêze!
10 Dema ez di nava ewlekariyê
de derbas bibim û biçim, bila yên
xerab bikevin torên xwe!

**Zebûr 142**

1 Maskîla Dawid e. Duaya ku
dema di şikeftê de bû kir. Ez bi
dengê xwe feryadê ji XUDAN re
dikim, ez bi dengê xwe lavayan ji
XUDAN re dikim.
2 Ez lavayên xwe li ber wî diri-
jînim[2], tengasiyên xwe li ber wî
dibêjim.
3 Dema ruhê min di min de bu-
hurî, tu rêya ku ez ê herim dizanî.
Bi dizîka, dafikê li rêya ku ez he-
rim avêtin.
4 Li aliyê rastê binêre û bibîne: Ji
ber ku kes min nahesibîne, cîhê ku
ez xwe lê bisitirînim nema, kesê ku
cihêtiyê li canê min dike nîne.
5 Ez ji te re diqêrim! ya XUDAN:
Sitargeha min, di warê zindiyan
de nisîbê min tu yî, dibêjim.
6 Guh bide qêrîna min, ji ber ku
ez pirr bêçare me; min ji yên ku
ketine pê min xelas bike; ji ber ku,
ew ji min xwurttir in!
7 Canê min ji zîndanê ve derxîne
ku, ez şikiryê ji navê te re bikim!
Wê demê, dê yên rast dora min
bigirin, ji ber ku te qenciyê ji min
re kiriye.

**Zebûr 143**

1 Zebûra Dawid e. Dua min bi-
bihîze, ya XUDAN! Guh bide
lavayên min! Bi dilsozî û rastiya
xwe ve bersivê bide min!
2 Û bi qûlê xwe ve nekeve dara-
ziyê; ji ber ku ji yên ku dijîn, qet
kesek li ber te salih dernakeve!
3 Ji ber ku neyar lêdanê li canê
min kirin, jiyana min li erdê ve
xistin. Mîna yên ku ji zû ve miri-
ne, min di tariyan de dan rûniştin.
4 Bo vêya ruhê min di hundirê
min de dibore; di hundirê min de
dilê min şaş dibe.
5 Ez rojên derbas bûyî di bîra xwe
de tînim; hemû kirinên te kûr difi-

[1] Di Septûaginta de: Bila mirovê rast, bi hezkirinê ve li min bixe û bi min re bixeyide, bila rûnê xeraban, bi serê min ve nê dayin.

[2] Diweşînim.

kirim û li karên destê te dinihêrim
û diponijim.
6 Destên xwe ji te re vedikim;
canê min mîna zeviyê ziwa, bi te
ve tî bûye. (Sela.)
7 Zû bersivê bide min, ya XU-
DAN! Ruhê min diçike; wecê
xwe ji min ve nezivirîne ku, ez
nebim mîna miriyên dadikevin
warê miriyan.
8 Serê sibehê xêra xwe bi min
ve bide bihîstin, ji ber ku ez bi te
ewle me; rêya ku ez ê tê de herim,
nîşanî min bide, ji ber ku ez canê
xwe, ber bi te ve bilind dikim!
9 Min ji neyarên min ve xelas bike,
ya XUDAN! Ez xwe disipêrim te.
10 Bikaranîna xwestinên xwe hînî
min bike! Ji ber ku Xwedayê min
tu yî. Ruhê te yî qenc, bila di rêya
rast de pêşengiyê ji min re bike!
11 Ya XUDAN, di oxra navê xwe
de jiyanê bide min; bi rastiya xwe,
min ji tengasiyê ve xelas bike!
12 Û ji ber xêra xwe, neyarên min
tune bike û hemû dijminên min
bikuje! Ji ber ku ez qûlê te me.

**Zebûr 144**

1 Zebûra Dawid e. Bila ji zinarê
min, XUDANê ku cengê hînî des-
tên min, şer hînî tiliyên min dike
re, pesnahî bibe!
2 Xêra min û keleha min, qûleya
minî bilind û yê ku min azad dike;
mertalê min û yê ku xwe disipêrim
wî; yê ku serê gelê min ji min re
xwar dike[1] ew e!
3 Ya XUDAN, mirov çî ye ku, tu
çavnêriyê li wî bikî, lawê mirov çî
ye ku, tu wî bifikirî?
4 Mirov mîna hilmekê ye; rojên
wî, mîna siyekî derbas dibin.
5 Ya XUDAN, ezmanan biqelişîne
û dakeve jêr, destê xwe bi çiyayan
bixe ku, bila bi dû bibin!
6 Birûskan bide û neyar belav
bike! Tîrên xwe biweşîne û wan
têxe şaşiyekê!
7 Ji jor ve destê xwe dirêj bike, min
xelas bike; ji avên kûr ve derxîne,
ji destê lawên xelkê ve xelas bike!
8 Devê wan derewan dibêje û
destên wanî rastê, destê rast yê
derewê ye!
9 Ya Xwedê! ez murxekî nû ji te
re bibêjim, pesnahiyê te bi çenkên
deh têlî, bi Zebûran bidim.
10 Tu yî, yê ku qiralan digehîne
serfiraziyê, yê ku qûlê xwe Dawid
ji şûrê xerabiyê ve xelas kiriye.
11 Min xelas bike û azad deyne, ji
destê gedên xelkê. Ji devên wan,
yên ku derewê diweşîne,
destên wanî rast, destê rastê yê
derewê ye!
12 Wê demê dê zarokên me, bi-
bin mîna şitilên bi tenduristî me-
zin bûne, dê keçên me bibin mîna
sitûnên bineqiş yên qesrê.
13 Dê embarên me, bi her tewr
zadî ve tijî bibin; dewarên me di

1 Li ber min datîne.

mêrgan de, bi hezaran û deh hezaran bizên.
14 Dê gayên me xwurt bibin, qul di bircên me de neyên vekirin û di qadên me de qêrîn neyên bihîstin!
15 Xwezî li gelên ku di vî rewşî de ne! Xwezî li gelê ku Xwedayê wan XUDAN e!

**Zebûr 145**

1 Qesîda Dawid ya pesnahiyê ye.
Ya Xwedayê min, ya Qiral, ez ê te bilindtir bikim û heta bêdawîbûnê pesna navê te bidim.
2 Ez ê her roj pesna te bidim û navê te heta bêdawîbûnê bilind bikim.
3 XUDAN mezin e û zehf liyaqî pesnahiyê ye û aqil nagihêje mezinahiya wî.
4 Dê kirinên te ji nifşe heta nifşeyan bi şikiryê bê di bîr anîn û karên te yî xwurt bên têgîhandin.
5 Ez ê karên te yî nuwaze bibêjim!
û mezinahiya te û rewnaqiya te yî bilind biaxifim.
6 Û dê qala hêza karên te yî tirsehêz yên ku te kirine bikin û ez ê jî mezinahiya te bidim bihîstin.
7 Dê qenciya te yî bêmînak bîranînên xwe pîroz bikin û bi murxên kêfxweşiyê ve pesnahiya rastiya te bidin!
8 XUDAN xêrxwaz û dilovan e, dereng hêrs dibe û bi xêrê ve tijî ye.
9 XUDAN ji her kesî re qenc e û dilovaniya wî jî, li ser hemû karên wî ne.
10 Hemû karên te şikiryê ji te re dikin, ya XUDAN û qulên te yî dilsoz pesnahiyan pêşkêşî te dikin.
11 Hêza qiraletiya te dibêjin û qudreta te diaxifin;
12 Bona ku her kes hêza te û rewnaqiya bilind ya serweriya te bizanibin.
13 Qiraletiya te, qiraletiyek bê dawî ye û serweriya te, di hemûya deman de didome.
14 XUDAN piştgiriyê li her yê ku ketî dike û yên du ta bûne jî rast dike.
15 Çavên hemûyan li hêviya te ne û yê ku di wextê de xwarina wan dide tu yî.
16 Tu destê xwe vedikî û hemû bicanan, li gor xwestinên xwe têr dikî.
17 XUDAN di hemû kirinên xwe de bi dadî û di hemû karên ku dike de dilovan e.
18 XUDAN nêzîkî her kesê ku bangî wî dike ye, hemûyên ku bi rastî bangî wî dikin.
19 Xwestina yên ku ji wî ditirsin tîne cîh û qêrînên wan dibihîze û wan xelas dike.
20 XUDAN heçî kesên ku hezkirê wî ne diparêze û hemûyên xerab tune dike.
21 Bila devê min, pesnahiyan pêşkêşî XUDAN bike! Û bila hemûyên bican, heta bêdawîbûnê pesnahiyan, ji navê wî yî pîroz re rêz bikin!

**Zebûr 146**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]! Ya canê min, pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bike!
2 Heta ku bijîm, ez ê pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bikim, heta ku
hebim, ez ê Zebûran ji Xwedayê
xwe re rêz bikim.
3 Bi serokan û bi mirovên ku nika-
rin we xelas bikin bawer nebin!
4 Dema ew hilma xwe yî dawîn
bide, dîsa vedigere axê, wê rojê
pêşniyarên wî diqedin.
5 Xwezî li mirovê ku alîkarê wî,
Xwedayê Aqûp e; yê ku hêviya
wî di Xwedayê wî XUDAN de
ye!
6 Yê ku ezman û erd, behrê û her
tiştên di hundirê wê de afirandi-
ye; yê heta bêdawîbûnê dilsoz
dimîne,
7 Yê ku mafê belengazan distîne,
xwarinê ji birçiyan re amade dike
ew e. XUDAN bindestan azad
dike.
8 XUDAN çavên koran vedike,
XUDAN yên xahr bûne, rast dike,
XUDAN ji rastan hez dike.
9 XUDAN xerîban diparêze, alî-
kariyê bi sêwî û jinebiyan re dike;
lê rêyên xeraban jî çewt dike.
10 XUDAN, Xwedayê te heta bê-
dawîbûnê, ya Siyon, dê di hemûya
nifşeyan de serweriyê bajo.
Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[2]!

**Zebûr 147**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[3]! Ji ber stirîna Zebûran,
bona Xwedayê me qenc e!
Ji ber ku şêrîn e, liyaqî pesnahiyê
ye.
2 XUDAN Orşelîmê ava dike, ew
sirgûnên Îsraêlê dide hev.
3 Ew dilşikestiyan qenc dike û
birînên wan dipêçe.
4 Hejmara sitêrkan dihesibîne, bi
navê wan, bangî her yekê dike.
5 XUDANê me mezin û pirr
xwurt e, fêhmkariya wî bêsînor e.
6 XUDAN alîkariyê ji belengazan
re dike, xeraban li erdê dixe.
7 Murxên şikiryê ji XUDAN re
bixwînin, bi lîr û çenkê pesnê
Xwedayê me bidin!
8 Ew e, yê ku ezmanan bi ewran ve
dadigre, yê baranê diweşîne rûyê
erdê, yê li çiyan gîhayan derdixîne.
9 Ew ji heywanan re xwarinê
amade dike, ji çêlikên qelareşkê
re, yên ku diqêrîn.
10 Ne ji hêza hespê ve zewqê di-
gire, ne jî ji egîdiya[4] mirovan ve
kêfê digire.
11 XUDAN ji yên ku ji wî ditirsin
û yên ku hêviya xwe bi xêra wî ve
girê dane re razî ye.

1 Halelûya!
2 Halelûya!
3 Halelûya!
4 Egîdiya: Bi Îbranîtî, ji pêlên wî.

12 XUDAN bilind bike, ya
Orşelîm! Pesnahiyan pêşkêşî
Xwedayê xwe bike, ya Siyon!
13 Ji ber ku hêzê tevî hesinê milên
deriyên te kir, di nava te de lawên
te pîroz kir.
14 Sînorên te, di nava dilxweşiyê
de digire, te bi genimê herî qenc
ve têr dike.
15 Emrê xwe dişîne rûyê erdê;
gotina wî zû belav dibe.
16 Mîna hiriyan berfê dibarîne;
xûsikê mîna xweliyê belav dike.
17 Cemeda xwe parî parî davêje,
ma kî dikare li hember serma wî
bisekine?
18 Gotina xwe dişîne û wan du-
hulîne, bayê xwe pêk tîne û av
dest bi herikandinê dikin.
19 Gotina xwe ji Aqûp re, Zagon
û seretayên xwe, ji gelê Îsraêlê re
dide xuya kirin.
20 Wekî din, bona tu nifşeyê vêya
nekir û ew bi seretayên wî nizanin.
Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]!

## Zebûr 148

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[2]! Ji ezmanan ve pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bikin:
di bilindahiyan de pesnahiyan
pêşkêşî wî bikin!
2 Ya hemû milyaketên wî, pes-
nahiyan pêşkêşî wî bikin, pesna-
hiyan pêşkêşî wî bikin, ya hemû
artêşên wî!
3 Ya roj û heyv, pesnahiyan
pêşkêşî wî bikin; pesnahiyan
pêşkêşî wî bikin, ya hemû sitêr-
kên dibiriqîn in!
4 Ya ezmanê ezmanan û avên li
ser ezmanan, pesnahiyan pêşkêşî
wî bikin!
5 Bila pesnahiyan pêşkêşî navê
XUDAN bikin! Ji ber ku wî emir
da û ew çê bûn.
6 Bi danîna qaîdeyek qet xera
nabe, wan heta bêdawîbûnê li
cîhê wan da rûniştinê.
7 Ji rûyê erdê, pesnahiyan pêşkêşî
XUDAN bikin, ya cenawirên
behrê û hemû balûpal!
8 Birûsk û zîpik, berf û ewr, baho-
zên li gor emirên wî dikin.
9 Çiya û hemûyên giran, darên
mêwan û hemûya darên serwiyan;
10 Heywanên hov û hemûya de-
waran, xişok û civîkên difirin!
11 Qiralên rûyê erdê û hemûyên
gelan, serok û hemû rêvebirên
rûyê erdê;
12 Xort û keçên ciwan, kalepîr û
zarok!
13 Bila pesnahiyan pêşkêşî navê
XUDAN bikin! Ji ber ku tenê
navê wî bilind e. Bilindahiya wî,
li ser erd û ezmana ye.
14 XUDAN gelê xwe xwurt kir,
nav û deng da hemû qûlên xwe

[1] Halelûya!

[2] Halelûya!

yî dilsoz, gelê ku nêzîkî wî ye
û lawên Îsraêlê re. Pesnahiyan
pêşkêşî XUDAN bikin[1]!

**Zebûr 149**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[1]! Murxekî nû ji XUDAN re
bibêjin,
di civaka qûlên wî yên dilsoz de,
bi murxan pesnê wî bidin!
2 Bila Îsraêl di Afirkirê xwe
de kêfxweşiyê bibîne; zarokên
Siyonê bi Qiralên xwe ve
bicoşin!
3 Bila bi kirina reqsê ve pesna-
hiyan pêşkêşî navê wî bikin, bi
lêxistina tef û lîrê, pesna navê wî
bi Zebûran ve bidin!
4 Ji ber ku, XUDAN ji gelê xwe
ve razî ye; dilnizman bi taca ser-
firaziyê ve dixemilîne.
5 Bila bi vê rûmetê kêfxweş bi-
bin qûlên wî, yên dilsoz, di nava
livînê xwe de murxên kêfxweşiyê
bixwînin!
6 Di devê wan de pesnahiyên bi-
lind bona Xwedê, di destê wan de
şûrê bi du devî,
7 Û bila ji netewan ve tolê bigirin
û gelan bidin ceza kirin:
8 Qiralên wan bi zincîran û biesi-
lên wan jî bi qeydê ve girê bidin!
9 Bila qirara ku hatiye nivîsandin,
dijî wan bînin cîh! Vêya, bona
hemû qûlên wî yên dilsoz rûmet e.
Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[2]!

**Zebûr 150**

1 Pesnahiyan pêşkêşî XUDAN
bikin[3]! Di qatê wî yî pîroz de,
pesnahiyan pêşkêşî Xwedê bikin!
Pesnahiyan pêşkêşî wî bikin, di ez-
manên ku hêza wî nîşan didin de!
2 Pesnahiyan pêşkêşî wî bikin,
bona karên wî yî bi hêz! Pesnahi-
yan pêşkêşî wî bikin, li gor mezi-
niya wî yî bêmînak!
3 Bi lêxistina boriyan, pesnahi-
yan pêşkêşî wî bikin! Bi çenk û
lîrê pesnahiyan pêşkêşî wî bikin!
4 Bi tef û reqsê pesnahiyan pêşkêşî
wî bikin! Bi saz û bilûrê ve pesna-
hiyan pêşkêşî wî bikin!
5 Bi zîlan ve pesnahiyan pêşkêşî
wî bikin! Bi zîlên ku diçingin ve,
pesnahiyan pêşkêşî wî bikin!
6 Bila hemû afirên bi can, pesna-
hiyan pêşkêşî XUDAN bikin! Pes-
nahiyan pêşkêşî XUDAN bikin[4]!

1 Halelûya!
2 Halelûya!
3 Halelûya!
4 Halelûya!

# METHELOKÊN SILÊMAN

*Pêşgotin*

Pirtûka Methelokan, bitûmiya hînkariyên exlaqî û olî yên bi şiklê biwêj û methelokan têne gotin e. Beşek mezin qaîdeyên di derbarê jiyana rojane de digire naveroka xwe. Pirtûk bi bîranîna: "Bingeha zanînê, tirsa XUDAN e," dest pê dike (1:7). Tenê bi dest dayîna qaîdeyên olî yên exlaqê namîne, bi taybetî jî li ser kirina mînakî û rastbûniyê disekine. Biwêjên kurt yên ku di pirtûkê de cîh digirin, daxuyaniya şîret û pêhesiyên di derbarê kirinên zilamê hişê wî li serê wî ye de, dike. Hinek ji vana di derbarê têkiliyên kar û hinek jî di derbarê yên malbatê de; dîsa hinekan di derbarê qaîdeyên dinyadîtî yên di nav têkiliyên civakî de cîhekî girîng digirin; hinek jî di derbarê xwekontrol kirina şexsî de ne. Mirov dikare bibêje ku di navbera mijarên ku di pirtûkê de gellekî qal û behsa wan tête kirin, dilnizmî, sebr, çavdêrî kirina mafê xizanan û ji dostan re dilsozî hene.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-6 | Pêşkêşî |
| 1:7-9:18 | Seretayiya zaniyariyê |
| 10:1-22:16 | Methelokên Silêman |
| 22:17-29:27 | Ji zaniyar sî şîret |
| 24:23-34 | Methelokên din yên zaniyaran |
| 25:1-29:27 | Beşa duwemîn ya Methelokên Silêman |
| 30:1-33 | Methelokên Agûr |
| 31:1-9 | Metheokên qiral Lamûêl |
| 31:10-31 | Taybetiyên pîreka hişpak |

*Armanca Methelokên Silêman*
Wai 12,11-14

1 Methelokên Silêmanê lawê Dawidê qiralê Îsraêlê: 2 Ev methelokna, bona gîhaştina zaniyarî û perwerdeyiyê, bona fêhm kirina gotinên bibaqilî.
3 Bona girtina perwerde ya dibe serfiraziyê û bi vî awayî kirina ya rast, biheq û dadî;

4 Bona kesên hişsivik, baqil, zi-
lamê ciwan jî bi zanîn û bi rast-
dîtin danînê ne.
5 Bila methelok û wekokan; bona
fêhm kirina gotin û pirsonekên
zaniyaran,
6 kesê zaniyar guhdarî bike û
feraseta xwe zêde bike, kesê baqil
jî hunera jiyanê qezenc bike.

*Ji xapandinan bireve*

Zeb 1,1; 7,15-17; 1.Kor 15,33

7 Bingeha zanînê, tirsa XUDAN
e, lê yên bêwac jî zaniyariyê û
perwerdê biçûk dibînin.
8 Lawê min, guh bide îkazên
bavê xwe, ji hînkariyên diya xwe
neqete!
9 Ji ber ku, dê vana, bona serê
te bibin çelengek dilovan, bona
histuyê te jî gerdaniyek.
10 Lawê min, xwe nede gunehkarên
ku bona xapandina te dixebitin.
11 Ger ew bibêjin: Bi me re were,
bona zilam kuştinê em têkevin
kemînê,
bona zewqê, kesên bêguneh bixin
dafikê!
12 Em wan, mîna warê miriyan
bi zindîtî, mîna yên ku dadikevin
kortala mirinê,
bi tûmî daqurtînin.
13 Em her tewrî malên biqîmet,
bi dest ve dixin û xaniyên xwe bi
xenîmetan ve dadigrin.
14 Bila di nava me de para te jî
hebe, kîsikê me hemûyan yek be!
15 Lawê min, bi yên ûsa re neçe, ji
rêya ku wan girtine dûr bisekine.
16 Ji ber ku, lingê wan ber bi xe-
rabiyê ve baz dide, bona xwîn ri-
jandinê her tim amade ne.
17 Ji ber tor raxistina li ber çavên
civîkan bêfêde ye.
18 Yê ku kemînê davê ber kesekî
din, bi xwe dikeve kemîna xwe,
canê wî bi xwe ye, ya ku dixe da-
fikê.
19 Dawiya zebûnê qezenca bi
neheqî ûsa ye, vê zebûniya, wan
ji canê wan ve dike.

*Dengê Zaniyariyê guhdarî bike*

M.Sil 8,1-21.32-36

20 Zaniyarî ji der ve, bi dengekî
bilind diqêre, di qadan de bang
dike.
21 Di serê kuçan de ajawe bang
dike, di deriyên bajêr yên ketinê
de gotinên xwe dide bihîstin:
22 Ya ehmeqno, hûn ê heta çi
wextê ji ehmeqiyê hez bikin? Û
dê yên qerfok heta kengê ji qerf
kirinê ve zewqê bigirin?
23 Dema îkaz kirina min, şunda
vegerin! A vay, ruhê xwe bi ser
we ve dirijînim; gotinê xwe ji we
re dişînim.
24 Lê belê, gava bangî we kirim û
we min red kirin, destê xwe dirêj
kirim û ne bi xema we kesekî bû.
25 Û we hemû şîretên min dan
nebihîstinê, nexwestin ku şîretên
min bibihîzin.

26 Bo vê yekê, dê ez ê jî bi asîwa
we ve kêfxweş bibim, dema hûn
rastî belayê bên 27 û dema bela,
mîna bahozekê bi ser we ve hat,
dema asîwa we mîna bahozekê hat;
dema hûn têkevin tengasî û xemê,
ez ê henekê xwe bi we bikim!
28 Wê demê hûn ê bangî min
bikin, lê belê ez ê bersivê nedim û
hûn ê bi hemûya hêza xwe li min
bigerin, lê belê min nebînin.
29 Ji ber ku, hûn ji zaniyariyê ve
kerihîn. Û we ji XUDAN tirsînê
red kirin.
30 We şîretên min nexwestin,
hemûya îkazên min biçûk dîtin.
31 Bo vê yekê hûn ê mêwa rêya
ku we pê girtibûn bixwin û bi fe-
nekiya xwe têr bibin.
32 Ji ber dê zilamên çavzîq, bibin
qurbanê çivanokiya xwe û yên
bêaqil jî di nava bêxemiya xwe de
tune bibin û herin.
33 Lê belê yê ku min guhdarî bikin,
dê di nava ewlekariyê de bijîn; ji xe-
rabiyê netirsin û aramiyê bibînin.

*Qenciyên Zaniyariyê*

2 Lawê min, ger tu guh bidî za-
niyariyê û ji dil berî bidî aqil,
2 Gotinê min qebûl bikî û emirên
min di aqilê xwe de bigirî;
3 Belê, ger tu bangî aqilê bikî, ji
dil bangî wî bikî,
4 Mîna li zîvê digerî li wî bigerî,
tu li wî bigerî û mîna li xezîneyê
bigerî;
5 Tuyê tirsa XUDAN fêhm bikî û
Xwedê, ji nêzîk de binasî.
6 Ji ber ku çavkaniya zaniyariyê
XUDAN e; ji devê wî zaniyarî û
fêhmkarî derdikeve.
7 Ew kesên rast digîhîne serfirazi-
yê, mertalê kesên rast dijîne.
8 Gavên yên bi dadî ne diparêze,
çavnêriyê li rêya qûlên xwe yî
dilsoz dike.
9 Tuyê wê çaxê her rêya ku qenc
e fêhm bikî û ka çi bi dadî, biheqî
û rast e.
10 Ji ber ku dê dilê te, bi zaniyari-
yê ve tijî be û tuyê ji zanînê zew-
qê bigire.
11 Dê rastdîtin notirvaniyê li te
bike û aqil jî te biparêze.
12 Dê vana te ji rêya xerab, ji go-
tinên bêexlaqan xelas bikin.
13 Ewên ku, bona di rêyên tarî de
bimeşin, ji rêya rast diqetin.
14 Ji xerabî kirinê hez dikin, ji xe-
rabiya zêde zewqê digirin.
15 Rêyên wan çivdayî û jiyana
wan çewt e.
16 Dê zaniyarî, te ji pîreka
bêexlaq, ya ku zilamê xwe yî di
ciwaniya xwe de zewicî ye di-
terikîne û sonda li ber Xwedê
xwendiye ji bîr dike, 17 dê te ji
pîreka bêwefa, ya ku bi gotinên
xwe ve çaplûsiyê dike, xelas
bike.
18 Ji ber ku mala wê pîreka mi-
rovan dibe mirinê û rêyên wê jî
dibin miriyan.

19 Heçiyên ku diçin wê, vena-
gerin û nikarin bigihêjin rêyên
jiyanê.
20 Bo vê sedemê, tu di rêya rastan[1]
de bimeşe û di şopa rastan de here!
21 Ji ber ku yên di welat de bijîn,
dê yên rast bin û kesên rast in, yên
ku li wir bimînin.
22 Lê belê dê yên xerab ji welêt
bên ajotin û yên xaîn jî bên girtin
û avêtin.

*Rêya Zaniyar*

3 Lawê min, hînkariyên min ji
bîr neke û emirên min di aqilê
xwe de bigire!
2 Ji ber ku, dê vana temena te
dirêj bikin û salên jiyana te û
dilxweşiya te zêde bikin.
3 Hezkirinê û dilsoziyê ji cem
xwe neqetîne, wan bi histuyê xwe
ve girê bide,
li lewha dilê xwe binivîse.
4 Bi vî awayî, tuyê di çavên Xwe-
dê û mirovan de, birêzî û eciban-
dinê qezenc bikî.
5 Bi hemûya dilê xwe, bi XU-
DAN ve ewle bibe û pişta xwe
nesipêre aqilê xwe.
6 Di her karê ku tu dikî de, wî nas
bike[2] û ew jî rêya te derxe rastiyê.
7 Xwe mîna yekî zaniyar nebîne,
ji XUDAN bitirse û ji xerabiyê
dûr bisekine.
8 Bi vî awayî dê bedena te tendu-
ristî û firehiyê bibîne.
9 Bi hebûn û nûbera dexlê xwe,
XUDAN bi rûmet bike.
10 Wê demê, dê embara te heta
serî tijî bibe[3] û keştiyên te jî bi
xemra teze ve tijî bibe û dê di ser
ve biçe.
11 Lawê min, îkazên XUDAN,
bi sivikî nebîne û ji pekandina wî
aciz nebe.
12 Ji ber ku XUDAN, mîna bavê
ku ji lawê xwe dilxweş e, bi hez-
kirên xwe ve dipeke.
13 Xwezî li yê ku gîhaştiye zani-
yariyê û aqilê dîtiye!
14 Ji ber ku qezenc kirina wê, ji
qezenc kirina zîvan qenctir e û
fêda wê ji zêran zêdetir e.
15 Ji mucevherê bi qîmettir e û
hemû tiştê ku tu dixwazî, bi wê re
nayê miqyasî kirin.
16 Di destê wê yî rastê de temena
dirêj, di yê çepê de hebûn û rûmet
hene.
17 Rêyên wê, rêyên kêfxweşiyê
ne û hemûya rêyên wê derdikevin
dilxweşiyê.
18 Ji bo yên pê girtine, zaniyarî
darê jiyanê ye û xwezî li yên ku
bi zexmî pê girtine.
19 XUDAN, bingeha dinê bi za-
niyariyê ve avêt û ezmanan bi ba-
qilî ve bicîh kir.

1 Salih.
2 Wî di bira xwe de bîne.
3 Heta serî tijî, an jî bi zad ve.

20 Bi zanîna wî, balûpal qelişîn û
ewran ava xwe dan.
21 Lawê min, xwe bi şîreta zexm,
bi rastîdîtinê ve bigire û qet çavên
xwe ji wan meqetîne.
22 Dê ew ê jiyanê bidin te û bona
histuyê te bibin xemlekî xweşik.
23 Tuyê wê çaxê, di nava ewleka-
riyê de rê bigire û nê tilpekîbûnê.
24 Tuyê bê tirs dirêj bibî û bi xe-
wekî şêrîn rakevî.
25 Ji asîwên ku mirov ne li bendê
ne, an jî ji têkçûna ku rastî xera-
ban tê, netirse!
26 Ji ber ku, ewlekariya te XU-
DAN e û ew ê te ji ketina dafikê
biparêze.
27 Heta ku ji destê te tê, qenciyê ji
yên ku heqê wan li qenciyê hene
re veneşêre.
28 Gava di destên te de hebe, ji
cîranê xwe re: Îro here, sibê were
û ez ê wê demê bidim te, nebêje.
29 Ji cîranê xwe yê bi te ewle
bûyî û li cem te dijî re, pêşniyara
xerabiyê neke.
30 Bi miroveki xerabiyê ji te re
nekiriye re, li cîhê vala nekeve
keftûleftê.
31 Dil nebijîne kesê zordest û qet
ji rêyên wî, yekî jî nebijêre.
32 Ji ber ku, XUDAN ji rêşaşan
dikerihe, lê belê hevaltiya wî bi
rastan re ye.
33 XUDAN mala xeraban bi na-
let dike, lê belê cîhê ku yên salih
rûdinin pîroz dike.
34 XUDAN henekê xwe bi qerfo-
kan ve dike, lê belê xêrê ji dilniz-
man re dike.
35 Dê kesên zana, bilindahiyê bi
mêrasî bigirin, lê belê yên bêaqil
şermiyê bistînin.

*Seretayiya Zaniyariyê*

4 Ya lawno, guh bidin îkazên
bavê xwe û bala xwe bidin ku
hûn sehîker bin!
2 Ji ber ku, ez dersê qenc didim
we; ji hînkirinên min meqetin!
3 Ji ber ku dema ez lawê bavê
xwe hîn li cem wî bûm, di çavê
diya xwe de nazik û yekane
bûm.
4 Û wî vêya hînî min kir û ji min
re got: Bila dilê te pêt bi gotinê
min bigire û emirên min bîne cîh
ku, tu bijî!
5 Li zaniyarî û aqil xwedî der-
keve; gotinên min ji bîr neke û ji
wan şaş nebe.
6 Ji zaniyariyê neqete û ew ê te
biparêze. Ji wê hez bike û ew ê
çavnêriyê li te bike.
7 Gava pêşîn ya zaniyariyê, li
wê xwedî derketine. Ger bibe
sedema windakirina hemûya
hebûna te jî, li aqil xwedî derke-
ve.
8 Wê li ser destan bigire, dê ew jî
te bilindtir bike û ger tu pê bigire,
ew ê te bilind bike.
9 Dê çelengekî alûs û tacekî bi
rewnaqî li serê te ke.

10 Guhdarî bike lawê min! û gotinên min bipejirîne ku, bila temena te dirêj bibe.

11 Ez ê te di rêya zaniyariyê de perwerde bikim û berê te bidim rêyên rast.

12 Ger tuyê biçî, gavên te naşidin[1] û ger tu baz bidî, tuyê xij nebe.

13 Bi perwerda ku te stendiye bigire, bernede, wê bîne cîh, ji ber ku jiyana te ew e.

14 Gavê xwe nevêje rêya xeraban û di rêya nemerdan de nemeşe.

15 Xwe ji wê rêya biparêze, di nêzîka wê de jî derbas nebe, berê xwe biguhere û derbas bibe!

16 Ji ber, heta ku ew xerabiyê nekin, nikarin rakevin û heta ku yekî ji rê dernexin, xewên wan direve.

17 Ji ber nanê ku dixwin berê xerabiyê û xemra ku vedixwin jî ya zordestiyê ye.

18 Lê rêya rastan, mîna ronahiya berbangê ye, her ku diçe, mîna şewla tava nîvrojê dibiriqe.

19 Rêya xeraban jî mîna reş û tarî ne; nizanin ku, ji bo çi tilpekî bûne.

20 Lawê min, bala xwe bide gotinên min, guh bide gotinên min.

21 Bila ev li ber çavên te neçin, wan di dilê xwe de veşêre!

22 Ji ber ku vana, bona yên ku wan bibînin jiyan û bona bedena wan jî şîfa ne.

23 Berî her tiştî jî dilê xwe biparêze, ji ber ku jiyan ji wê çavkanî dibe.

24 Bila derew ji devê te dernekevin û lêvên xwe ji gotinên rêşaş dûr bigire.

25 Bila çavên te, tim li pêşiyê û mijangê te rasterast li pêşiya te binêrin!

26 Rêya ku tuyê tê de biçe rast bike û wê demê, dê hemû karên te zexm bibin.

27 Bi rast û çepê ve neçe, lingê xwe ji xerabiyê ve dûr bigire.

*Îkazên li dijî Zînayê*

1.Kor 6,15-20; Pey 2.20-23

5 Lawê min, bala xwe bide zaniyariya min, guh bide gotinên minî bibaqilî.

2 Bi vî awayî, tuyê her tim bi rastdîtin bibe û bi lêvên xwe zaniyariyê biparêze.

3 Ji ber hungiv ji lêvê pîreka ku zinê dike ve diweşe û devê wê ji zeytê jî nermtir e.

4 Lê belê dawiya wê, mîna gihayê pêlînê[2] tahl, qasî şûrê bi du devî jî tûj e.

5 Lingên wê diçin mirinê, gavên wê digihêjin warê miriyan.

6 Qet li ser rêya ku diçe jiyanê nafikire,
rêyên wê çivanokî ne, lê belê hayê wê jê nîne.

1 Lingên te li paş erdê ve nakevin.

2 Gihayê wermûtê.

7 Û niha, ya lawno, min guhdarî
bikin û ji gotinê ku ji devê min
derdikevin neqetin!
8 Ji pîrekên ku ûsa ne, dûr biseki-
ne û nêzîkî deriyê mala wê nebe.
9 Ya na, tuyê rûmeta xwe bi dest
yekî din bixe û salên xwe jî bi xe-
darekî.
10 Dê yên xerîb hemû hebûn û
tunebûna te bixwin û biqedînin,
keda te dê mala yekî din ava bike.
11 Tuyê axînê bikişîne û binale
di rojên dawiya temena xwe de,
dema goşt û bedena te biçike.
12 Tuyê çima ez ji perwerdebûnê
ewqasî dikerihîm, çima dilê min
guh neda îkazan? bibêje.
13 Û: Gotina mamosteyên xwe
guhdarî nekirim û guh nedam yên
ku min perwerde dikirin.
14 Ez di nava gel û civatan de, ha-
time qeraxa têkçûnekî bêkêmasî.
15 Avê ji sarinca xwe û ji çavka-
niya bîra xwe vexwe.
16 Bila kaniyên te kûçan, çemên
te jî avdana qadan bike!
17 Bila ew tenê yê te bin û bi bi-
yanan re par neke.
18 Bila kaniya te bi bereket bibe û
bi pîreka xwe yî tu di ciwantiya xwe
de pê re zewiciye ve, dilxweş bibe!
19 Mîna askek dilovan û mîna xe-
zalek narîn[1], bila pêsîrên wê, tim
te têr bikin,
bi evîna wê tim û tim bicoşe.
20 Û lawê min, çima tûyê bi
pîrekekî bêexlaq ve bicoşî û çima
pîreka yekî din têxe paşla xwe?
21 Ji ber XUDAN çavnêriyê li rêya
ku mirov digirin, dike û çavdêriyê
li her gavê ku davêje, dike.
22 Dê sûcên wî, kesê xerab bide
dest û benê gunehên wî, bi zexmî
wî girê bide.
23 Dê ehmeqiya wî yî zêde wî ji
rê derxe û ji ber ku guh nade per-
werdeyê, dê bimire.

*Li dijî Kemînan baldar be!*

M.Sil 11,15; 22,26-27; 20,25

6 Lawê min, ger tu ji yekî re
bûbe kefîl, ger te deynê wî li
xwe kiribe bar;
2 Ger tu bi gotinên xwe ketibe da-
fikê, bi gotinên devê xwe hatibe
girtin.
3 Ûsa tê dîtin ku, tu ketiyî destê
wî kesî. Lawê min, vêya bike û
xwe xelas bike:
Here û li ber wî xwe bavêje erdê,
li ber wî bigere.
4 Bila xew nekeve çavên te û
pêlûyên te giran nebin.
5 Mîna xezala ku ji destê nêçîrva-
nan û mîna civîkan, ji destê civîk-
vanan xwe xelas bike.

*Îkazek li dijî kesê teral*

M.Sil 26,13-16; 24,30-34

6 Ya kesê teral, here li gêrikan
binêre û ji jiyana wan hînî zani-
yariyê bibe.

[1] Nazik, an ji: Fodil.

7 Serok, pêşeng an jî rêvebirên
wan nîne, lê belê dîsa jî,
8 Havînê erzaqên xwe didin hev,
di demsala dexlê de xwarinên
xwe ber hev dikin.
9 Tuyê heta kengê rakeve, ya kesê
teral? Tuyê kengê ji xewa xwe
rabe?
10 Berî ku tu, ez hinekî pê herim,
hinekî jî bi xewî bibim, destên
xwe bidim hev û hinekî ûsa ra-
zêm, bibêje; 11 û dê tunebûn mîna
rêbirekî û xizanî mîna êrîşkirekî
bi ser te de were.
12 Yê di devê xwe de bi derewan
ve digere, bêesil û fesadkar e.
13 Çavê xwe dişikîne, komek lîs-
tikên linga bi tiliyê xwe ve vego-
tinê dike[1].
14 Yê bêexlaq, di dilê xwe de
pêşniyara xerabiyê dike, bê sekin
keftûleftan ava dike.
15 Bo vê yekê, dê nişka ve rastî
têkçûnê bê; nişka ve dê bi bêçaretî
tune bibe.
16 Şeş tiştên ku XUDAN jê dike-
rihe û heft tiştên ku jê erjengî dibe
hene: 17 Çavên bi xirûr, zimanê
derewîn û destên ku xwîna bêsû-
can dirijîne;
18 Dilê fenek, lingên ber bi xera-
biyê ve diçin;
19 Şahdeyê derewîn, yê ku de-
rewînê dihilme û kesê ku di nava
birayan de keftûleftê derdixe.

*Li dijî Zînayê îkazek din*
20 Lawê min, li pêy emirên bavê
xwe here û ji hînkariyên dayika
xwe neqete.
21 Bila vana her tim bibin peywen-
diyê dilê te, wan têxe histuyê xwe.
22 Dê di rêya te de, ji te re bibin
rêber, gava tu rakeve dê te biparê-
zin û gava tu hişyar bibe, dê bi te
re biaxifin.
23 Ji ber ku ev emirana ji te re çira
û yên ku hatine hîn kirin jî, ji te re
ronahiye û îkazên perwerdê rêya
jiyanê nîşanî te didin.
24 Yê ku te ji pîreka xerab, ji zi-
manê ku çaplûsiyê ji pîrekên mi-
rovên din xelas bike, ev in.
25 Bila xweşikya pîrekên ûsa te
nexapîne û nêrînên wê te bindest
nekin!
26 Ji ber ku, bona fahîşeyekê mi-
rov dibe motajê pariyek nan[2] û bi
raketina pîreka yekî din re jî dibe
sedema mirinê.
27 Ma mirov gava agir têxe paşila
xwe, qey kincê wî naşewite?
28 An jî di ser pêtan de bimeşe,
qey lingên wî naqemirin?
29 Rewşa zilamê ku, bi pîreka
kesekî din re rakeve ev e; yê ku
têkeve têkiliyekî ûsa, bê ceza
namîne.
30 Ger dizê birçî, bona têr kiri-
na zikê xwe bidize, kes wî biçûk
nabîne.

1 Dest û milê xwe kil dike.

2 An jî: Ji ber ku heqê fahîşê, tenê nanek somi ye.

31 Lê gava bê girtin, hewce ye ku
heft qatê tiştê ku diziye bide; ev
bê mana dayîna hemûya hebûna
wî jî be.
32 Zilamê ku zinê dike, bêyî rast-
dîtin e, bi kirinên xwe, xwe tune
dike.
33 Yê ku dikeve para wî, lêxis-
tin û bêrûmetî ye û tu carî ji
şermezariyê xelas nabe.
34 Ji ber ku çavnebarî, hêrsa mêr
sor dike û roja tolê bêmerhamet
dibe.
35 Qet fîdyekê qebûl nake, tu ni-
karî dilê wî, bi zêdeyiya xelatan
bistînî.

*Xortekî bêyî rastdîtinê dikeve dafika Fahîşê*

7 Lawê min, gotinên min bîne
cîh û emirên min, di hişê xwe
de bigire. 2 Emirên min bîne cîh
ku, tu bijî û hînkariyên min mîna
bîbokên çavên xwe biparêze!
3 Wan, mîna gustîlkan têxe tiliyên
xwe, di lewha dilê xwe de binivî-
se. 4 Ji zaniyariyê re: Tu xwuşka
min î!
û ji aqilê re jî: Tu merivê min î!
bibêje. 5 Yên te ji pîreka ku zinê
dike, ji pîreka bêexlaq ya çaplûsi-
yê dike xelas bikin: ev in!
6 Ji ber ku dema min ji şivaka
mala xwe, ji paşî qefesê der ve
temaşe dikir:
7 Û di nava gellek xortên cahil de,
xortekî bêyî rastdîtin bi ber çavên
min ve ket.
8 Ber êvarê, di reş belekiyê û
dema tariyê de dadiket; 9 dîtim
ku, ket kuça wê pîreka lê rûdine û
berî da mala wê.
10 Û di wê demê de pîrekek bona
pêşbaziyê derket, bi qelafetê xwe
yî fahîşê û bi dizîka dil ve.
11 Pîrek, yeka bi galegal û serhişk
bû, demekê jî li malê nasekine.
12 Geh li kuçan, geh li qadan e û di
serê kuçeyan de kemînê davêje.
13 Girt û yê xort ramûsand û bê
şermî ji wî re got:
14 Ez hewce bûm ku, qewlên xwe
yî dilxweşiyê pêşkêş bikim, soza
xwe yî qewlê, îroj anîme cîh.
15 Bona vêya ez bona gerîn û
pêşbaziya te derketim, a vay, te
dîtim!
16 Rûberên rengîn yên ku ji tayê
Misirê ve hatine tewn kirin, li ser
doşega xwe raxistim.
17 Darçîn, mur û talîjariyê li livî-
na xwe kirim.
18 De were, em heta sibehê têra
xwe bi hev şa bibin, ji evînê zew-
qê bigirin!
19 Ji ber ku zilamê min ne li malê
ye, ew çû rêwîtiyek dirêj.
20 Kîsê pera girt cem xwe, berî
heyva tijî dê venegere malê.
21 Wê bi gellek gotinên cazib ve
wî meyl kir[1], bi zimanê xwe yî
şêrîn ve wî li pêy xwe kişand.

[1] Ji serî derxist, an jî: Ji rê derxist.

22 Mîna gayên ku dibin selexanê,
hema li pêy wê çû yê xort û mîna
aska ku dikeve dafikê, heta ku tîrek
kezeba wî qul bike; 23 mîna civîka
ku ber bi feqê ve direve û nizane
ku ev ê bibe sedema jiyana wî[1]!
24 Ya lawno, niha min guhdarî bikin
û guh bidin gotinên devê min!
25 Tu carî dil nedin wê pîreka û di
rêya wê de neçin!
26 Ji ber pirr qurbanên wê yên ku
li erdê raxistiye hene û hejmara
kesên ku kuştiye, zehf zêde ne.
27 Mala wê, rêya ku diçe qebrê
ye, dibe odeyên mirinê.

*Guh bide Zaniyariyê*

8 Ma zaniyarî bang nake û aqil
dengê xwe bilind nake?
2 Ew li serê girên ku li qeraxa
rêgehan e, li cîhê ku rê yek dibin
disekine.
3 Di destpêka bajêr de, li ber deri-
yan, dengê xwe bilind dike:
4 Ya mirovno, ez bangî we dikim
û banga min ji zarokên mirovan
re ye[2]!
5 Ya kesên çavzîq, hînî ferasetê
bibin û bi rastdîtinbûnê hîn bibin,
ya bêaqilno!
6 Gotinên min yên rayedar ku ez
dibêjim guhdarî bikin! Ji ber ku
devê xwe bona gotina rastiyan
vedikim.
7 Û devê min rastiyê têdighîne.
Û ji ber ku lêvên min, ji xerabiyê
erjengî dibin.
8 Hemû gotinên ku ji devê min
derdikevin rasterast in; yê rêşaş û
çewt di wan de nîne.
9 Bona yên ku fêhm bikin, ew
hemû eşkere ne û yê ku digihêje
zanînê, rastiya wan dizane.
10 Dêvla zîvan bibin xwediyê
perwerdeyiya min û dêvla zêran
jî zanînê.
11 Ji ber ku zaniyarîtî, ji gewheran
biqîmettir e û tu tiştê ku tu bixwa-
ze, bi wê re nayê muqayese kirin.
12 Min bi zaniyaritiyê, mineqiyê
ji xwe re kir xanî. Zanîn û rast-
dîtin bi min re ne.
13 Ji XUDAN tirsîn, tê mana ku
kerihandina xerabiyê ye. Ez ji
kubrê, kanciyê, ji rêya xerab û
devê rêşaş dikerihim.
14 Şîret û biryara qenc taybetiyên
min in; serkaniya aqil û hêzê ez
im.
15 Qiral bi saya min ve serweri-
yê dajon û hukimdar jî qeyîdeyên
bi dadî datînin.
16 Serek û biesilên bi dadî
rêvebirtiyê dikin; bi saya min
rêvebiriyê dikin.
17 Ez jî ji hezkirên xwe hez dikim
û yê ku bi xîret[3] li min bigere, dê
min bibîne.

1 Sedema mirina wî!
2 An jî: Ji nijada mirovahiyê ye!
3 Zû.

18 Hebûn û bilindahî, rûmetên
baqî û zêdeyî li cem min in.
19 Mêwa min ji zêran, ji zêrê safî û
bera min ji zîvên bijartî qenctir e.
20 Ez di rêya rastiyê de, di şopa
dadiyê de dimeşim.
21 Bi vî awayî, hezkirên xwe di-
kim xwedî serwet û embarên wan
bi xezîneyan ve dadigrim.
22 XUDAN di destpêka rêya xwe
de xwediyê min bû, hîn berî ku wî
tu tiştekî neafirandîbû, ez hebûm.
23 Berî ku dinya hebe, ta ji berî
destpêkê, bêpêşîbûnê ve cîhê xwe
girtim.
24 Dema hîn balûpal tune bûn,
kaniyên avzêde tune bûn, ez weli-
dîbûm.
25 Hîn berî çiya çêbibin, girr xuya
bibin, berî ku wî dinê, 26 beyaran
û her dinokê axa ku li dinê biafirî-
ne, ez welidîbûm.
27 Dema wî ezmanan danî cîhên
wan ez li wir bûm[1], dema behrên
balûpal bi bergehan zivirand.
28 Dema ewran afirand, bingehên
behrê xwurt kir.
29 Bona ku av ji emrê wî wêde
neçin, gava sînorê ji behrê re
kişand, dema bingehê dinê zexi-
mand:
30 Ez bi ser hosteyî li cem wî
bûm û ez roj bi roj, bi kêfxweşiyê
ve tijî bûm, li ber wî, her tim bi
coşiyê ve ketim.

[1] Ez tevî bûm.

31 Dinya wî dilxweşiya min û mi-
rovên wî kêfxweşiya min bûn.
32 Ya lawno, niha min guhdarî
bikin: Xwezî li kesên ku di rêya
min de diçin!
33 Hînkariyê guhdarî bikin û bi-
bin kesên żaniyar û wî red nekin!
34 Xwezî li kesê ku min guhdarî
dike, her roj çavnêriyê li deriyê
min dike û yê ku ji şemûga deriyê
min ve cuda nabe!
35 Ji ber ku, yê min bibîne, dê ji-
yanê bibîne û birêziya XUDAN
qezenc bike.
36 Lê yê ku li dijî min guneh bike,
dê xesarê bide canê xwe; hemû
kesên ku ji min dikerihin, ji mi-
rinê ve hez dikin.

*Gelo tuyê ji Zaniyariyê, an jî ji Bêaqiliyê hez bikî?*

9 Zaniyarî mala xwe ava kir,
heft sitûnê xwe rewêrt.
2 Heywanên xwe serjêkir, xemra
xwe amade kir û sifra xwe danî.
3 Bi navdîtiya xizmetkarên xwe
yî şandiye, nuxtikê herî bilindahi-
ya bajêr, bangî her kesî dikin:
4 Kî hişşivik be, bila were vir!
dibêje. Ji yên ku bêyî rastdîtinê
ne jî: 5 Werin, ji xwarinên min bi-
xwin û ji xemra ku amade kirime
vexwin! dibêje.
6 Dev ji hişşivikiyê berdin û bijîn
û li pêy rêya aqil herin!
7 Yê ku bi qerfok re bixeyide,
biçûkdîtinê li xwe heq dike û yê

ku bi kesê xerab re bixeyide, rastî
heqaretê tê.
8 Bi qerfok re nexeyide, ya na dê
ji te bikerihe; ger tu bi zaniyar ve
bixeyide, dê ji te hez bike.
9 Ger tu kesê zaniyar perwerde
bikî, ew ê hîn jî bi zanîn bibe; tu
hînî kesê rast bikî, ew ê zanîna
xwe zêde bike.
10 Destpêka zaniyariyê, ji XU-
DAN tirsîn e û aqil, nasîna yê
Pîroz e.
11 Ji ber ku dê bi saya min rojên
te zêde bibin û sal beşdarî temena
te bibin.
12 Ger tu zaniyar be, qenciya za-
niyariya te ji te re ye û ger tu qer-
fok be, tenê tuyê êşa wê bikişîne.
13 Pîreka bêaqil bi galegal;
hişşivik e û tu tiştekî nizane.
14 Û di deriyê mala xwe de, li
cîhê herî bilind yê bajêr de, li kur-
siyekê rûdine;
15 bona ku bangî yên di rê de der-
bas dibin; yên ku di rêya xwe de
diçin bike:
16 Kî hişşivik be, bila were vir!
dibêje. Û ji yên ku bêyî rastdîtinê
ne jî: 17 Ava diziyê şêrîn û xwari-
na ku bi dizîka tê xwarin, bi tahm
e! dibêje.
18 Û çi heye ku, yên dikevin mala
wê, nizanin ku diçin mirinê, yên
dibin mêvanê wê.
nizanin ku dadikevin binê qebrê.

*Muqayese kirina rastî û xerabiyê*

10 Methelokên Silêman:
Lawikê zaniyar bavê xwe
kêfxweş dike, lê belê lawikê bêa-
qil dilê diya xwe dihêle.
2 Qenciya hebûna ku bi neheqi-
yê ve hatiye qezenc kirin nîne. Lê
belê rastî, ji mirinê ve xelas dike.
3 XUDAN canê kesê rast birçî
nahêle; lê belê xwestina xeraban
vala derdixîne.
4 Destên teral, mirovan xizan
dike; lê belê destê jîr dewlemend
dike.
5 Lawê hiş li serî, dexlê havînê dide
hev; lê lawê ku di dirûnê de radike-
ve jî, rûreşiya malbata xwe ye.
6 Bereket, bi ser serê kesê rast ve
dibare, lê belê yên xerab jî zordes-
tiya xwe, bi gotinê vedişêrin.
7 Yên rast bi pesnahiyê ve, lê
belê yên xerab bi kerihandinê ve
tê bîr anîn.
8 Kesê zaniyar, emiran qebûl
dike, lê belê ehmeqê çengbêj jî
rastî têkçûnê dibe.
9 Kesê durist, di nava ewlekariyê
de dijî; lê belê yê ku di rêya fene-
kiyê de diçe, dê bê eşkere kirin.
10 Yê ku bi dizîka çav dişikîne,
dibe sedema êşan[1]; lê ehmeqê
çengbêj jî, rastî têkçûnê dibe.
11 Devê kesê rast, kaniya jiyanê
ye, lê belê yên xerab jî zordestiya
xwe bi gotinê vedişêrin.

1 Septûagînta: Yê ku bi metirsiyê bipeke, dilxweşiyê peyde dike.

12 Kerihîn keftûleftê zêde dike, lê
belê hezkirin li her sûcî diborîne.
13 Ji lêvê kesê fehmkar zaniyarî
diherike[1]; lê belê ji bo pişta yê ku
fehmkariya xwe kêm e, ço heye.
14 Kesê zaniyar, zanînê dide ber
hev, lê belê devê kesê ehmeq ji wî
nêzîkî têkçûnê dike.
15 Serweta yê dewlemend, keleha
wî ye, lê xizaniya feqîr ji wî dibe
têkçûnê.
16 Heqdestê kesê rast jiyan e; lê
wariyeta xerab jî ji wî re ceza ye.
17 Yê ku guh bide perwerdê, dê
rêya jiyanê bibîne. Lê yê ku îka-
zan red bike jî, kesên din ji rê ve
derdixe.
18 Lêvên kesê ku kerba xwe
vedişêre derewîn in û yên ku
tawanbariyê belav dikin bêaqil in.
19 Gunehê kesên pirr diaxife,
kêm nabe; lê kesê bi rastdîtin jî bi
zimanê xwe digire.
20 Zimanê kesê rast, mîna zîva
safî ye, lê belê nêtên yê xerab jî
bêqîmet in.
21 Gotinên kesê rast, gellekan
xwedî dikin, lê belê ehmeq jî, ji
tunebûna rastdîtinê ve dimirin.
22 Yê kesan dewlemend dike, be-
reketa XUDAN e û ew derdê tevî
vêya nake.
23 Xerabî, bona bêaqilan mîna
şahiyê ye, lê bona kesên hişê wan li
serê wan e, zaniyarî wekî wê ye.
24 Tirsa kesê xerab, tê serê wî,
lê kesê rast jî, digihêje xwestina
xwe.
25 Dema bahoz tê, kesê xerab
digre û dibe, lê belê kesê rast, heta
bêdawîbûnê li ser pêlan dimîne.
26 Bona diranan sîrke û bona ça-
van jî duh çawa be, şandiyê teral
jî, bona yê ku wî şandiye ûsa ye.
27 Tirsa XUDAN temenê dirêj
dike, lê belê salên xeraban jî kurt
in.
28 Hêviya kesê rast, wî kêfxweş
dike, lê belê tiştên ku xerab li ben-
dê ye, dê li valahiyê derkeve.
29 Rêya XUDAN, bona durist si-
targehek, lê belê bona fesadkir jî
têkçûn e.
30 Kesê rast, tu carî nalerize, lê
belê yê xerab, nikarin li welat bi-
sekinin.
31 Ji devê kesê rast zaniyarî di-
herike[2], lê belê zimanê rêşaş jî tê
jê kirin.
32 Lêvên kesê rast, bi gotina ku
dê bê gotin dizanin, lê belê ji devê
yê xerab jî gotinên rêşaş derdike-
vin.

11 XUDAN ji pîvanoka bi fen
erjeng dibe, lê belê ji pîva-
noka bêfen jî dilxweş dimîne.
2 Li pêy kanciyê şermezarî tê; lê
belê zaniyarî, di dilnizman de ye.
3 Duristiya kesê xawênî, rêgehê

[1] Zanyarî di lêvên mirovê fehmdar de tê dîtin.
[2] Dibêje, an jî: Pêk tîne.

nîşanî wî dide, lê belê derewîniya
kesê xaîn jî, wî dibe têkçûnê.
4 Roja xezebê serwet ji tu karî re
nabe, lê belê rastî ji mirinê ve xe-
las dike.
5 Rastiya mirovê durist rêya wî
rast dike, lê belê kesê xerab jî ji
ber xerabiya xwe têk diçe û di-
keve.
6 Rastiya yê xawênî wî xelas
dike, lê belê hêrsa yê xayîn wî
dide dest.
7 Dema kesê xerab bimire, hê-
viyên wî tune dibin û hêza ku pê
ewle ye jî diqede.
8 Kesê rast ji tengasiyê xelas dibe,
lê li dêvla wî, kesê xerab tengasi-
yê dikişîne.
9 Kesê bêxwedê mirovên din bi
devê xwe dibe têkçûnê, lê belê
yên rast bi saya zanînê ve xelas
dibin.
10 Bajar, ji serfiraziya rastan re
cejnê çêdike û ji mirina xeraban re
jî qêrînên kêfxweşiyê tên avêtin.
11 Bi pîroz kirina duristan bajar
geş dibe, lê belê devê xeraban,
bajêr bi erdê ve yek dike.
12 Yê ku kesê din biçûk dibîne,
bêyî rastdîtinê ye; lê belê kesê ba-
qil jî, bi zimanê xwe ve digire.
13 Gotegotkir nikare razê veşêre; lê
belê kesê ewlekar jî dibe hemraz.
14 Neteweyê ku rênîşankirê wê
tune be, dikeve; lê belê yê ku
amojkarê wê zede be, dê here ser-
firaziyê.
15 Yê ji biyan re bibe kefîl, mu-
heqeq dê bixesire; lê yê ku ji ke-
fîltiyê bireve jî, dê di nava ewle-
kariyê de bijî.
16 Pîreka dilovan birêziyê[1] qe-
zenc dike, lê yên zordest serwetê
qezenc dikin.
17 Dilovaniya rindîxwaz ji xwe re
ye, lê yê xedar jî asîwê tîne serê
xwe.
18 Qezenca kesê xerab xapînokî
ye, lê xelata kesê rastiyê çandiye
jî bi ewle ye.
19 Yê ji dil ve rast e, dê bigihêje
jiyanê, lê yê ku li pêy xerabi-
yê here, dê mirina xwe amade
bike.
20 Kesên dilçewt, ji XUDAN re
erjeng in; lê belê ew ji yên ku du-
rist dijîn jî dilxweş dimîne.
21 Bizanibin ku kesê xerab bê
ceza namîne! Lê belê nîjada yên
rast jî xelas dibe.
22 Xweşikya pîreka ku bêyî fera-
set e[2], mîna xelika zêrîn ya di pozê
berazan de ye.
23 Xwesteka rastan tim bi qenci-
yê ve diçe serî; hêviya xeraban jî
bi xezebê ve.

---

1 Paşi gotina birêziyê, di Septûaginta de ev rêza derbas dibe: lê belê pîreka ku ji rastiyê dike-rihe, texta bêxiretiyê ye. Teral ji bêyî serwetê diminin.
2 Fêhmkor.

24 Yê destvekirî, hîn jî zêde qe-
zenc dike; lê dawiya yê heqxwar
xizanî ye.
25 Canê comerd, dê bigihêje
firehiyê û dê av ji kesê ku avê
daye yekî din re bê dayîn.
26 Gel, yê ku genim dide berhev
bi naletî dike; lê belê ji serê yê ku
difiroşe re bereket heye.
27 Yê ku qenciyê dike armanc,
ecibandinê qezenc dike; lê yê ku
xerabiyê kiriye armanc, rastî xe-
rabiyê tê.
28 Yê ku bi dewlemendiya xwe
ewle dibe, dê ser serî here; lê belê
yên rast jî, dê mîna pelê di guliyê
de geş bibin.
29 Mêrasa yê ku tengasiyê dide
malbata xwe ba ye û yên ehmeq
jî dibin qûlê yên ku ji dil zaniyar
in.
30 Karên kesê rast, mîna mêwa
darê jiyanê ye û kesê zaniyar, mi-
rovan qezenc dike.
31 A vay, li vê dinê kesê rast tê
ceza kirin, çiqas zêde dê yê xerab
û gunehkar!

12 Yê ku ji perwerdebûnê hez
dike, ji zanînê jî hez bike
û yê ku ji pekandinê dikerihe
bêwac e.
2 Kesê qenc, digihêje xêra XU-
DAN, lê belê XUDAN, yê fenek
mehkûm dike.
3 Xerabî, kesî nagehîne ewlekari-
yê, lê belê koka rastan nayê kolan.
4 Pîreka xawênî, taca mêrê xwe
ye, lê belê pîreka bêedep mêrê
xwe dixwe û diqedîne.
5 Pêşniyarên rastan dadî, lê şîretên
xeraban xapînokî ne.
6 Gotinên xeraban, dafika mirinê
ne, lê belê axaftina rastan jî wan
xelas dike.
7 Yên xerab têk diçin û xera dibin
û mala yê rast, li ser pêlan dise-
kine.
8 Pesna mirov qasî rastdîtina wî
tê dayîn, lê kesên ramançewt jî tê
biçûk dîtinê.
9 Yê xwedî dîl e û biçûk tê dîtin, ji
yê ku xwe mezin dibîne û motajî
nan e qenctir e.
10 Kesê rast canê heywanê xwe
diparêze.
lê belê dilovaniya yê xerab jî bi
zalimî ye.
11 Nanê kesê ku axê dajo zêde
dibe;
lê kesê li pêy xeyalan baz dide jî,
bêyî rastdîtinê ye.
12 Kesê xerab xenîmeta xeraban
dixwaze, lê belê reha kesên rast
zad dide.
13 Gotinên gunehî yên kesê xerab
bona wî dafik e, lê belê kesê rast,
tengasiyê derbas dike.
14 Mirov bi bera devê xwe ve
têr dibe û li gor keda destê xwe jî
berdêla wê distîne.
15 Rêya yê ehmeq di çavê wî de
rast e, lê belê kesê zaniyar jî guh
dide şîretê.

16 Ehmeq hêrs bûna xwe hema eşkere dike, lê belê yê baqil şermê dinuxumîne[1].

17 Şahdeyê durist rastiyê dibêje, lê belê hilma şahdeyê derewîn jî fenekî ye.

18 Gotinên bêfikirandin hatine gotin, mîna şûr dibirin; lê belê zimanê zaniyaran jî şîfê dide.

19 Gotinên rast heta bêdawîbûnê baqî ne, lê belê temena derewan bi demekê ye[2].

20 Di dilê yê ku pêşniyara xerabiyê dike de fenekî heye; lê di dilê yê ku aşitiyê şîret dike de jî kêfxweşî heye.

21 Ji kesê rast re qet xesirandin nayê, lê belê serê xeraban jî ji asîwê xelas nabe.

22 XUDAN ji lêvên derewîn ve dikerihe, lê belê ji yên ku li pê rastiyê diçin jî kêfxweş dimîne.

23 Mirovek baqil zanîna xwe ji xwe re vedişêre, lê belê dilê bêaqil jî ehmeqiya xwe bang dike.

24 Destê jîran serweriyê dajon, lê belê teralî jî dibe dîlitiyê.

25 Dilê bi xem mirov dixîne, lê belê gotina xweş kêfxweş dike.

26 Kesê rast, rê nîşanî hevalê xwe jî dide, lê belê rêya ku xerab digire, xwe jî çewt dike.

27 Kesê teral karê xwe naqedîne[3], lê belê yê jîr serwetik biqîmet qezenc dike.

28 Rêya rast, çavkaniya jiyanê ye û vê rêya dibe bêmirinî yê.

13 Lawê zaniyar, li fêrkirina bavê xwe guhdarî dike, lê belê kesê qerfok, bê pekandin jî guh nadê.

2 Mirovê qenc, ji ber gotinê ku ji devê wî derdikeve tê bixelat kirin, lê belê hilma ku yên xayîn dikişînin zordestî ye.

3 Yê ku zimanê xwe bigire, dê canê xwe biparêze; lê belê dawiya yê çengbêj têkçûn e.

4 Teral nikare tiştê ku canê wî bixwaze, bi dest bixe; lê belê hemû xwestekên jîr tên cîh.

5 Kesê rast, ji derewê ve dikerihe, lê belê gotinên yê xerab jî erjengî û rûreşî ne.

6 Rastî, yê ku durist dijî diparêze û xerabî yê gunehkar têk dibe.

7 Hinek kes, li ber tiştekî wî tune be jî xwe dewlemend dide xuya kirin û hinek kes jî, li ber hebûna wî zêde ye jî xwe xizan dide xuya kirin.

8 Fidya canê mirov dewlemendiya wî ye, lê belê kesê xizan gefan nabihîze.

---

1 Guh nade biçûk ditinê.

2 An jî: Lêvên rast heta bêdawîbûnê diminin, lê belê zimanê derew tenê bona demekê ye.

3 Karê xwe naqedîne: Bi Îbranîtî, nêçîra xwe napêjine.

9 Şewla rastan, bi rewnaqî vêdi-
keve, lê belê çira xeraban ditefe.
10 Ji kubrê tenê şer derdikeve; lê
yê guh dide şîretan jî zaniyar e.
11 Perê ku ji hewayê hatiye qe-
zenc kirin, tune dibe; lê hebûna
yê ku hindik hindik daye ber hev
zêde dibe.
12 Hêviya ku hatiye texîr kirin,
dil nexweş dike; lê dema xwestek
bê cîh, darek jiyanê ye[1].
13 Yê ku guh nede îkazan, dê
berdêla wê bide; lê yê ji emiran re
bihurmet e, dê xelata xwe bigire.
14 Hînkirinên zaniyaran çavkani-
ya jiyanê ne, mirovan ji dafikên
mirinê ve dûr dixe.
15 Têkiliya bi rastdîtin, birêziyê
dide qezenc kirin, lê belê rêya
xayînan jî dibe têkçûnê.
16 Kesê bi feraset, bi zanînê karê
xwe dike; lê kesê bêaqil jî ehme-
qiya xwe dide temaşe kirinê.
17 Şandiyê xerab dikeve asîwê, lê
belê şandiyê ewlekar jî şîfê tîne.
18 Tunebûn û şermezarî li benda
yê ku nêzîkî perwerdebûnê naçe
ne; lê belê yên ku guh bidin pe-
kandinê, dê bên bilind kirin.
19 Xwesteka ku were cîh,
kêfxweşiyê dide û lê yê bêaqil,
nikare li dûrî xerabiyê bisekine.
20 Yê ku bi zaniyaran ve rûdine
û radibe, dibe zaniyar; lê belê yê
ku bi bêaqilan ve dibe heval, di-
xesire.
21 Asîw paşiya gunehkar berna-
de, lê belê xelata rastan jî dewle-
mendî ye.
22 Kesê qenc ji neviyên xwe re
mêrasê dihêle, lê belê hebûna gu-
nehkar jî ji kesê rast re dimîne.
23 Zeviya xizanan dikare zadê
zêde bide, lê belê neheqî vêya di-
gire û dibe.
24 Yê ku çoyê xwe diparêze[2], ji
lawê xwe dikerihe; lê belê yê ku ji
wî hez dike, bi pûte pêdanê[3] per-
werde dike.
25 Xwarina kesê rast, têra wî
heye, lê belê zikê yê xerab jî birçî
dimîne.

14 Pîreka zaniyar, mala xwe
ava dike û pîreka ehmeq,
mala xwe bi destê xwe xera dike.
2 Yê ku di rêya rast de dimeşe, ji
XUDAN ve ditirse; lê yê ku ji rê
derdikeve, wî biçûk dibîne.
3 Gotinê ehmeq, ji pişta wî re ko-
tek in; lê belê lêvên zaniyar wî
diparêzin.
4 Ger ga tune be, êmlik vala dimî-
ne; ji ber ku yê berê zêde dike,
hêza ga ye.
5 Şahdeyê ewlekar derewa nabêje,
lê belê hilma şahdeyê derewîn jî
derewan dikişîne.

[1] Jiyanê dide.
[2] Yê ku ji lawê xwe çoyê xwe diparêze.
[3] Bi îhtimamê, di dema xwe de, an jî: Zû ve.

6 Yê qerfok li zaniyariyê bigere jî, nikare wê bibîne; lê belê bona yê baqil jî bi dest xistina zanînê hêsan e.

7 Ji kesê bêaqil ve dûr bisekine û ji ber tiştekî wî nîne ku, hînî te bike.

8 Zaniyariya kesê baqil, zanîna çi kirina xwe yî û ehmeqiya bêaqilan jî xapandin e.

9 Yên ehmeq, bi pêşkêşiya sûcan[1] ve henekê xwe dikin, lê belê yên durist jî nêt qenc in.

10 Dil bi êşa xwe dizane û tu kes jî kêfxweşiya wê li hev par nake.

11 Dê mala kesê xerab, bi erdê ve bibe yek, lê belê dê mala kesê rast jî bikulîlk bibe[2].

12 Rêyek ûsa heye ku, ji mirov re rast xuya dike, lê belê dawiya wê mirin e.

13 Dema mirov dikene jî, dil bi êş e û dawiya kêfxweşiyê keser e.

14 Yê ku dilê wî çivanok e, xelata rêya ku pê girtiye û kesê qenc jî xelata kirinên xwe bigire.

15 Kesê hişsivik bi her gotinê ve bawer dibe, lê belê yê baqil jî hisabê gava xwe ya davêje dike.

16 Yê zaniyar ji ber ku ditirse, ji xerabiyê dûr dikeve, lê belê yê bêaqil jî fortê mezinahiyê dide û bi xwe ewle dibe.

17 Yê ku zû hêrs dibe, tiştên bi ehmeqî dike û her kes ji yê fenek dikerihin.

18 Mêrasa kesên hişsivik bêaqilî ye, lê belê taca kesên bimineq[3] jî zanîn e.

19 Nemerd di pêşiya qencan de û yê xerab jî di deriyê rastan de xwar dibin.

20 Heta cîranê wî jî ji xizan hez nake; lê belê hevalê yê dewlemend pirr in.

21 Biçûkdîtina cîranan guneh e; xwezî li yê ku xêrê ji belengazan re dike!

22 Ma yê pêşniyara xerabiyê dike, qey rêya xwe şaş nake?
Lê belê yê pêşniyara qenciyê dike, hez kirin û dilsoziyê qezenc dike.

23 Her ked qezencê tîne, lê belê galegala vala dibe xizaniyê.

24 Taca zaniyaran hebûna wan e; lê yên bêaqil jî bi ehleqiya xwe ve tên nasîn[4].

25 Şahdeyê durist, can xelas dike; lê şahdeyê derewîn xapînokî ye.

26 Yê ku ji XUDAN ditirse, di ewlekariyek bêkêmasî de ye û dê ew ji zarokên wî re jî bibe sitargeh.

27 Ji XUDAN tirsîn, çavkaniya jiyanê ye, mirovan ji dafikên mirinê ve dûr dixin.

---

1 Bi pêşkêşiya sûcan, an jî: Bi sûc.
2 Avadan, an jî: Geş dibe.
3 Bisemt.
4 An jî: Lê çelenga bêaqilan ehmeqî ye.

28 Bilindahiya qiral li gor zêdeyi-
ya gelê wî ye, lê belê ger gel tune
bibe, hikumdar jî mehf dibe.
29 Yê ku dereng hêrs dibe zehf
baqil e, lê belê yê ku zû hêrs dibe,
ehmeqiya xwe dide xuya kirin.
30 Dilê biaram çavkaniya jiyanê
ya bedenê ye, lê belê hêrs jî mi-
rovan ji hundir ve dixwe û diqe-
dîne.
31 Yê zordestiyê li motajan
dike, tê wê mana ku Afirker jî
biçûk dibîne; lê yê ku gunehê
wî bi xizanan bê, Afirker bilindtir
dike.
32 Kesê xerab, bi asîwa ku rastî
wî hatiye mehf dibe, lê belê cîhê
mirovê rast ku di mirinê de jî xwe
bisipêre heye.
33 Zaniyarî di dilê kesê rast de
dimîne; lê belê tiştê ku di nava
bêaqilan de ye xwe xuyanî dike.
34 Rastî neteweke bilindtir
dike, lê belê guneh bona gelan
şermezarî ye.
35 Qiral qûlê xwe yî bi eqlî
selîm diecibîne; lê belê bi yê ku
şermezariyê tîne re jî hêrs dibe.

15 Bersiva nerm hêrsê aş dike,
lê belê gotina ku birîndar
dike, hêrsê sor dike.
2 Zimanê zaniyar zanînê dibêje,
lê belê ji devê bêaqil jî ehmeqî
diherike.

[1] Jiyanê dide.

3 Çavê XUDAN tiştê ku li her
derê dibe dibîne, çavnêriyê li qen-
can jî, xeraban jî dike.
4 Zimanê dilxweşker dara ji-
yanê ye[1], lê belê zimanê çewt ruh
birîndar dike.
5 Yê ehmeq îkazên bavê xwe
biçûk dibîne; lê yê bi feraset guh
dide pekandinê.
6 Mala kesê rast mîna xezîneyekî
mezin e; lê belê wariyeta yê xerab
jî çavkaniya tengasiyê ye.
7 Lêvên zaniyaran zanînê belav di-
kin, lê belê dilê bêaqilan ne ûsa ye.
8 Qurbanên xeraban ji XUDAN
re erjeng in, lê belê duaya rastan
wî dilxweş dike.
9 XUDAN ji rêya xeraban dike-
rihe, lê belê ji yê ku li pêy rastiyê
diçe hez dike.
10 Yê ku ji rê derdikevin, bi dij-
warî tên ceza kirin û yê ku ji pe-
kandinê dikerihe, dê here mirinê.
11 XUDAN, bi tiştên ku li warê
mirin û têkçûnê dibe û diqedin,
dizane, ka li ku ma dilê mirovan!
12 Kesê qerfok ji pekandinê ve
hez nake; naçe û bi zaniyaran ve
naşêwire.
13 Dilê geş wecan bi kêf dike; lê
belê dilê bi êş ruhê diperçiqîne.
14 Dilê mirovê baqil li zanînê di-
gere, lê belê devê bêaqilan xwe bi
ehmeqiyê ve xwedî dike.
15 Hemû rojên belengaz bi tenga-
siyê ve tijî ne, lê belê dilekî geş ji
xwediyê xwe re her tim ziyafet e.

16 Xizan bûn û ji XUDAN tirsîn,
ji dewlemend bûn û di nava xe-
man de jiyînê ve qenctir e.
17 Xwarina sewzê ya bi hezki-
rinê, ji xwarina gayê dermale, ya
di nava kerihandinê de qenctir e!
18 Kesê bêxû keftûleftê pêk tîne,
lê belê kesê bi sebir jî şerê aş
dike.
19 Rêya yê teral mîna çepera bi
kelem e, lê belê rêya yê rast jî
mîna rêgeha mezin e.
20 Lawê zaniyar bavê xwe
kêfxweş dike, lê belê mirovê bêa-
qil jî diya xwe biçûk dibîne.
21 Kesê bêyî eqlî selîm bi ehme-
qiya xwe ve kêfxweş dibe, lê belê
kesê baqil jiyanek durist dajo.
22 Li cîhê ku şîret tunebe fenekî
vala derdikevin; lê belê bi pirrani-
ya şîretkiran ve disekine.
23 Bersiva li cîh, xwediyê xwe
kêfxweş dike û gotina ku di cîhê
xwe de tê gotin, çiqas xweşik e!
24 Kesê bi eqlî selîm, di rêya ku
diçe jor, ya jiyanê de ye, ev jî dike-
ve ber daketina wî yî warê miriyan.
25 XUDAN mala yê bi kubir xera
dike, lê belê sînorê jinebî diparêze.
26 Pêşniyarên xeraban ji XUDAN
re erjengî ye, lê belê ji ramanên
paqij re kêfxweş dimîne[1].
27 Kesê zebûnê qezencê ye, ten-
gasiyê dide mala xwe: lê yê ku ji
bertîlê dikeribe, bi reheti dijî.
28 Dilê kesê rast, bersiva xwe baş
diwezîne; lê belê devê yê xerab jî
xerabiyê direşîne.
29 XUDAN ji xeraban ve dûr di-
sekine, lê belê dua rastan dibihî-
ze.
30 Çavên ku dikenin dil kêfxweş
dikin; xebera qenc bedenê berfireh
dike.
31 Yê ku îkazên jiyanê didin guh-
darî dike, di nava zaniyaran de
disekine.
32 Yê ku ji perwerdê direve,
xisarê dide canê xwe; lê yê ku
guh dide pekandinê, eqlî selîmê
qezenc dike.
33 Ji XUDAN tirsîn, zaniyariyê
dide hîn kirinê û dilnizmî jî berî
rûmetê tê.

16 Ramanên dil yê mirov in; lê
belê bersiva ziman ya rast,
ji XUDAN e.
2 Di çavê mirov de hemû rêyên
wî paqij in; lê belê yê ku nêtan di-
wezîne XUDAN e.
3 Karên ku tuyê bikî, emanetî
XUDAN bike û wê çaxê dê
pêşniyarên te bibin.
4 XUDAN her tiştî li gor armanca
xwe çê dike û rêya têkçûna kesê
xerab jî ew amade dike.
5 Her kesê ku dilê wî qanc e, ji
XUDAN re erjeng e; bizanibin ku
yê ûsa bêceza namînin!

1 Ji ramanên paqij re kêfxweş dimîne, an jî: Gotinên şêrin paqij in.

6 Hezkirin û dilsozî sûcan didin
borîn û tirsa XUDAN mirovan ji
xerabiyê dûr dihêle.
7 Ger XUDAN bi jiyana kesî ve
dilxweş be, heta ew neyarên wî jî
bi wî re li hev tîne.
8 Tiştên hindik, yên ku bi rastiyê
ve hatine qezenc kirin, ji wariyeta
mezin ya ku bi neheqiyê ve hati-
ye qezenc kirin, qenctir e.
9 Mirov di dilê xwe de pêşniyariya
rêya ku biçe dike, lê belê XUDAN
berî dide gavên wî.
10 Xwedê emirên xwe bi devê qi-
ral dide xuya kirin: Bo vê sedemê,
divê dadiya qiral neyê cûtin.
11 Mêzîna serrast û selikên mê-
zînê yên XUDAN in; hemî ke-
virên weznê kîsikê karên wî ne.
12 Xerabî kirin ji qiralan re mek-
ruh e; ji ber ku text bi dadiyê ve
dizexme.
13 Qiral ji kesê ku rast dibêje re
dilxweş dimîne û ji yê ku durist
diaxife hez dike.
14 Hêrsa qiral, nûçevanê mirinê
ye; lê belê kesê zaniyar wî aş dike.
15 Ger wecê qiral bikene, ew tê
mana jiyanê û xêra wî mîna ewrê
ku, barana biharê tîne ye.
16 Qezenc kirina zanînê, ji zêrê
ve bi qîmettir e û xwedîbûna aqil
jî, ji zîvê ve qenctir tê dîtin!
17 Rêya ku kesê durist digirin, ji
xerabiyê ve dûr dike: yê ku bala
xwe bide rêya xwe, canê xwe di-
parêze.
18 Li paşî xirûrê têkçûn û li paşî
ruhê bi kubir jî ketin tê.
19 Di nava belengazan de mîna
yekî dilnizm bûyîn, ji bi kubiran re
par kirina mala talanê qenctir e.
20 Yê ku guh bide şîretê, dê bi-
gihêje serfiraziyê û yê ku bi XU-
DAN ve ewle be, dê dilxweş bibe.
21 Ji yên ku bi dilzaniyar in re,
baqil tê gotin û gotina şêrîn hêza
qanih kirinê zêde dike.
22 Eqlî selîm bona xwediyê xwe
çavkaniya jiyanê, lê belê ehmeqî
jî ji ehmeqan re ceza ye.
23 Aqilê zaniyar rê dide zimanê
wî û hêza qanih kirina lêvên wî
zêde dike.
24 Gotinên xweş mîna hungivê
çîçê[1] ne, ji can re şêrîn û ji bedenê
re şîfa ne.
25 Rê heye ku, ji mirov re rast
xuya dibe, lê belê dawiya wê
rêyên mirinê ne.
26 Madê kedkara ye, yê ku wî
dixebitîne, ji ber ku birçîbûna wî,
wî dide ber qemçiyan[2].
27 Yên nemerd bona kesên din
pêşniyara xerabiyê dikin û axaf-
tinên wî, mîna agirê qemirandinê
ye.
28 Kesê bêxû keftûleftê mezin
dike û yê kistûpistê dike, hevalên
ji can ji hev dike.

1 Pêtagê.

2 Wî qemçî dike.

29 Kesê zordest, mirovên din di-
xapîne û bera wan dide rêya ne
qenc.
30 Çav şikandin ji fenekiyê, ke-
nokên dizî jî ji xerabiyê re nîşan in.
31 Porên sipî taca rûmetê ne; bi
jiyana rast ve tê qezenc kirin.
32 Kesê bi sebir, ji egîdan seretatir
e û yê çavdêriya xwe dike jî, ji yê
ku bajar feth kiriye ve bilindtir e.
33 Peşkê ji sîngê re davêjin, lê
belê her biryara wê ji XUDAN e.

17 Pariyek xwarina di nava
aramiyê de, ji mala bi şer û
ziyafetê ve tijî qenctir e.
2 Dîlê bi eqlî selîm, li lawê ku
malbata xwe dixe şermezariyê
dibe serwer û tevî birayan, ji
mêrasê ve parê distîne.
3 Zêr di ocaxê de, zîv di qaba hul-
andinê de tên safî kirin; lê belê yê
ku dilan pak dike, XUDAN e.
4 Kesê xerab lêvên bi fesadiyê ve
tijî ne, guhdarî dike; derewçîn jî
guh dide zimanê xerakir.
5 Yê ku qerfa xwe bi xizan re
bike, Afirkirê wî biçûk dibîne; lê
yê ku bi asîwê ve kêfxweş dibe,
bêceza namîne.
6 Nevî taca kalepîran in û pesnahi-
ya zarokan dayik û bavê wan in.
7 Çawa gotinên pesindanî li yê
ehmeq neyên; lêvên derewîn jî li
yê biesil nayên.
8 Di çavê xwediyê wê de bertîl
tilsimek e; çi bike serfiraz dibe.
9 Kesê ku hezkirinê dixwaze, li
sûcan diborîne; lê yê ku bûyerê ji
devê xwe re dike benîşt, hevalên
ji can ji hev diqetîne.
10 Bi kesê baqil re xeyidîn, ji sed
derbî lêxistina li yê bêaqil ve bi
tesîr e.
11 Kesê xerab tenê dilxwazê serîhil-
danê ye; lê belê dê şandiyê ku ji wî
re bê şandin, bêmerhamet be.
12 Li bêaqilekî harbûna wî li ser
wî ye rast hatin, li ji rasthatina hir-
çek mê ya ji çêlikên xwe qetiya
ye, xerabtir e!
13 Ji mala kesê ku berdêla qenci-
yê bi xerabiyê ve dide, xerabî qut
nabe.
14 Destpêka şer, mîna av ji ber
çûnê ye û berî ku tu rê li teqîneke
veke, dev jê berde.
15 Mirovê, kesê xerab pak dike û
ji yê ku rastiyê mehkûm dike, her
du jî ji XUDAN re erjeng in.
16 Kesekî bêaqil, çima bona sten-
dina zaniyariyê pere xerc bike? Ji
xwe bêyî eqlî selîm e.
17 Heval her tim hez dike û bira
di roja teng de xuya dibe.
18 Kesê bêyî eqlî selîm dest
dişidîne û ji yekî din re dibe kefîl.
19 Yê ku ji serî hildanê hez dike,
ji şer hez dike; yê ku deriyê xwe
bilind çê dike, bona têkçûna xwe,
dawetnamê derdixe.
20 Divê kesê rêşaş ne li benda
qenciyê be û yê ku bi zimanê xwe
ve dixapîne jî dikeve asîwê.

21 Yê bêaqil ji ya ku wî anîne
dinê re derd e û bavê yê ehmeq,
kêfxweşî çî ye, nizane.
22 Firehiya hundirîn tenduristiyê
tîne, lê belê ruhê perçiqiye jî be-
denê dihincirîne.
23 Kesê xerab bona ku dadmen-
diyê çewt bike, bi dizîka bertîlê
distîne.
24 Kesê baqil çavê xwe ji zani-
yariyê ve naqetîne, lê belê çavê yê
bêaqil jî tim li rast û çepê ye.
25 Lawê bêaqil keseriyê dide bavê
xwe û êşê jî dide diya xwe.
26 Ne ceza birîna ji bêsûc re qenc
e, ne jî bona durist kar kiriye li
wezîfadar xistin.
27 Kesê bi zanîn kêm diaxife û
kesê baqil jî bi ruhekî aram e.
28 Ehmeqê bi çenga xwe digire û
bêdeng dimîne jî zaniyar û baqil
tê hesibandin.

18 Kesê neberbihêr li pêy
qenciya xwe ye, tim li dijî
şîreta qenc radibe.
2 Kesê bêaqil ji fêhm kirina tiştekî
zêdetir ji vekirina ramanên xwe
hez dike.
3 Li pêy xerabiyê biçûk dîtin û li
pêy şermê jî şermezarî tê.
4 Gotinên ji devê kesê zaniyar
derdikevin, mîna avên kûr in.
kaniya zaniyariyê jî mîna çemek
bicoş.
5 Ji yê xerab re cihêtî kirin jî, ji yê
bêsûc parastina dadiyê jî ne qenc e.
6 Lêvên kesê bêaqil rê li keftûleftê
vedikin û devê wî jî bangî lêxis-
tinê dike.
7 Devê kesê bêaqil wî bi xwe
mehf dike û lêvên wî jî bona canê
wî dafik e.
8 Kustûpist mîna parîkê şêrîn e û
ta diçe hundirê mirovan.
9 Kesê guh nade karê xwe jî bi-
rayê xerakir e.
10 Navê XUDAN qûleya xurt e;
bona kesê rast, yê xwe sipartiye
wê, sitargeh e.
11 Yê dewlemend, dibêje qey ser-
weta wî kelehek û dîwarek nayê
derbas kirin e.
12 Li pêy xirûra di dil de ketin û li
pêy dilnizmiyê jî rûmet tê.
13 Bersiv dayîna bêguhdarî kirin,
ehmeqî û şermezarî ye.
14 Ruhê mirovan di nexweşiyê de
piştgirê wan e; lê belê ruhê per-
çiqandî çawa dikare di berxwe de
bide?
15 Dilê kesê baqil zanînê distîne
û guhê zaniyar jî li pêy zanînê ye.
16 Xelat, rêya yê ku dide vedike û
wî derdixe pêşiya mezinan.
17 Di doza xwe de yê ku pêşiyê
diaxife, biheq tê dîtin; lê belê yekî
din derkeve û pirsiyariyê li wî bike.
18 Vijag dawiya keftûleftan tîne û
pêşbazên xwurt li hev tîne.
19 Birayê xeyidiye ji bajarê bi
birc jî bi zortir tê qezenc kirin û
keftûleft mîna deriyê kelehê yê bi
zend e.

20 Zikê mirovan bi mêwa devê
wan, bi bera zimanê wan têr dibe.
21 Ziman dikare bibe mirinê jî,
jiyanê jî û yê ku ji axaftinê hez
dike, hewceye ku baldirêjiyê li
mêwa ziman ve bike.
22 Yê ku pîrekek qenc bibîne,
qenciyê dibîne û digihêje xêra
XUDAN.
23 Xizan parsa heyflêhatinê dike,
lê belê bersiva yê dewlemend jî
dijwar e.
24 Hevalên ku dibin têkçûnê jî
hene[1], lê belê hevalek ûsa heye ku
ji bira nêzîktirî mirovan e.

19 Xizanê ku di kamiliya xwe
de dimeşe, ji yê ku bêaqil e,
lê lêvên wî rêşaş in qenctir e.
2 Hewesa bêzanîn ji tiştekî re
nabe û lezkirina lingan, mirova
dibe çewtiyê.
3 Ehmeqiya mirov, jiyana wî xera
dike û dîsa jî di dilê xwe de ji XU-
DAN re hêrs dibe.
4 Dewlemendî hevalan li ser
hevalan dide qezenc kirin; lê
belê hevalê xizan wî li ser rû ber
dide.
5 Şahdeyê derewçîn, bêceza namî-
ne û yên ku bi hilma xwe derewê
dikişînin nikarin xelas bibin.
6 Gellek kes dixwazin ku têkevin
çavê kesên rast û bibin hevalê yê
dest vekirî.
7 Hemû birayên merivên xizan jî
ji wî dikerihin; hîn jî biryar e ku
dê hevalê wî jî ji wî dûr bisekinin!
Ew bi gotinan dide pêy wan, lê
belê ew nîn in.
8 Yê ku hîkmetê qezenc bike, ji
canê xwe hez dike; yê ku bi fêhm-
kariyê ve bigire dê qenciyê bibî-
ne.
9 Şahdeyê derewçîn bêceza namî-
ne û yên ku bi hilma xwe ve de-
rewê dikişînin nikarin xelas bi-
bin.
10 Ger bona bêaqil ajotina jiya-
nek bi rewnaq ne li cîh be; serwe-
riya dîlan li ser serokan qet ne li
cîh e!
11 Kesê bi eqlî selîm bi sebir e û
xweşdîtina wî yî qisûran. rûmetê
ji wî re dide qezenc kirin.
12 Hêrsa qiral mîna hurmîna şêrê
ciwan e. lê belê xêra wî jî mîna
xunava dikeve ser gîhayan e.
13 Lawê bêaqil. asîwa serê bavê
xwe ye û pîreka dirdirê dike. mîna
ava ku tim diqute ye.
14 Mal û hebûn ji bavan ve mêras
e. lê belê pîreka bi eqlî selîm xe-
lata XUDAN e.
15 Teralî mirovan ber bi tevizan-
dinê ve dibe û kesê har jî birçî
dimîne.
16 Yê ku li gor emrê dike canê
xwe diparêze; lê yê ku bala xwe
nede rêyên xwe. dê bimire.

1 Hevalên ku dibin têkçûnê jî hene. an jî: Yê ku gellek hevalên wî hene. dê here têkçûnê.

17 Yê ku heyfa wî li xizan bê,
ûsa tê ku, bi deyn dabe XUDAN
û bona qenciya ku wî kiriye, XU-
DAN xelatê dide wî.
18 Hîn hêvî heye lawê xwe per-
werde bike; lê belê nebe sedema
têkçûna wî.
19 Divê mirovê bêxû cezê xwe
bikişîne, ji ber ku tu wî carekî xe-
las bike jî divê tu dîsa wê bikî.
20 Guh bide şîretê û perwerdeyê
qebûl bike ku, di mayîna temena
xwe de tu zaniyar bibe.
21 Mirov di dilê xwe de pêşniyara
pirr tiştî dike. lê belê ya çê dibe.
armanca XUDAN e;
22 Ya ku ji mirov tê xwestin, dil-
sozî ye û xizanîbûn ji derewçînê
qenctir e.
23 Tirsa XUDAN digehîne jiya-
nek têr û bêderd û şer jî ji wî dûr e.
24 Yê teral destê xwe di beroşê ve
dadike, naxwaze ku wê şunda ve-
gerîne devê xwe.
25 Ger tu li qerfok bixe. dê yê
çavzîq baqil bibe û ger tu bi yê
zaniyar ve bipeke. dê zanînê tevî
zanîna xwe bike.
26 Lawê ku êrîşî bavê xwe dike.
diya xwe diqewirîne. şermezarî û
rûreşiya malbata xwe ye.
27 Ger xwestina te ji gotinên zan-
yariyê çewtbûn be. lawê min. dev
ji guhdarîkirina şîretan berde!
28 Şahdeyê nêt xerab bi dadiyê ve
qerfê xwe dike û devê xeraban. bi
fesadiyê ve xwedî dibe.
29 Bona qerfokan ceza û bona
pişta bêaqilan kotek amade ye.

20 Xemr mirovan qerfok,
araq jî bigalegal dike û yê
ku bi tesîra wê ji rê derkeve. ne
zaniyar e.
2 Hêrsa qiral mîna hurmîniya şêrê
ciwan e; yê ku wê bi hêrs bike, dê
ji canê xwe bibe.
3 Ji şer ve revîn bona mirovan rû-
met e, lê belê her yekê ehmeqan
bona guftegoyê amade ye.
4 Teralê ku di payîzê de cot najo
û di dirûnê de li tiştê ku digere
nabîne!
5 Nêtê dilê mirovan mîna avên
bîrekî kûr in. lê belê kesê baqil
wan eşkere dike.
6 Pirraniya mirovan ez bi wefa
me. dibêjin;
lê belê kî dikare yekî dilsoz bibî-
ne?
7 Xwezî li zarokên ku. xwedî ba-
vekî rast û duristin!
8 Qiralê ku di kursiya daraziyê de
rûdine. hemû xerabiyan bi çavên
xwe ve dineqîne.
9 Kî dikare ku bibêje: Dilê xwe
pak kirim. ji gunehê xwe safî
bûm?
10 XUDAN ji pîvanoka bi hîle jî.
ji pîvana bi hîle jî dikerihe.
11 Heta zarok jî bi lêkerên xwe ve
xwe dide xuya kirin. gelo kirinên
wî pak in û rast in. an ne ûsa ne.
dê bê fêhm kirin.

12 Guhê ku dibihîze û çavên
ku dibîne jî, her du jî XUDAN
afirandiye.
13 Ger tu ji xewê ve hez bike,
tuyê xizan bikeve; ger tu hişyar
bimîne, dê nanê te zêde bibe.
14 Yê ku bikire: Ji tiştekî re nabe,
ji tiştekî re nabe! dibêje; lê belê
paşî bistîne û biçe, bi ya ku sten-
diye, pesnahiyê dike.
15 Dibe ku gewher û zêrên te yî
pirr û zêde hebin; lê belê lêvên
ku zanînê diherikînin, hîn jî bi
qîmet in.
16 Kincê yê ku ji nenasê xwe re
bûye kefîl, bistîne. Ger bona xe-
rîbekî kiribe, kincê wî bi rehîntî
bigire!
17 Xwarina ku bi fenekiyê hati-
ye qezenc kirin, ji mirov re şêrîn
tê, lê belê pişt re devê wî tijî xîç
dibe.
18 Pêşniyarên xwe bi şêwirê ve
bike û li gor rêbazan şer bike.
19 Yên kustûpistê dikin, nikarin
raza veşêrin û bo vê yekê, bi dev
sistan re hevaltiyê neke.
20 Dê ronahiya kesê ku xeberan
ji dayik û bavê xwe re didin, di
tariya reş de bitefe.
21 Dawiya mêrasa ku zû ketiye
dest, bi bereket nabe.
22 Nebêje: Ez ê berdêla vê xera-
biyê bidim te; li benda XUDAN
be, ew ê te xelas bike.
23 XUDAN ji pîvanoka bi hîle di-
kerihe û teraziya bi hîle neqenc e.
24 XUDAN rê dide gavê mirovan
û wê çaxê mirov çawa dikare rêya
ku girtiye fêhm bike?
25 Bêfikirîn ji pîrozan re kifr kirin
û pişt re vepirsandina qewlan, ji
bo mirovan kemîn e.
26 Qiralê zaniyar xeraban dine-
qîne û mîna bênderê bajo, wan bi
ceza dike.
27 Ruhê mirovan, ronahiya XU-
DAN e, di hebûna hundirîn de
dineqş e.
28 Hezkirin û dilsozî ewlekariya
qiral e û ya ku texta wî dizexmî-
ne, hezkirin e.
29 Rewnaqiya ciwanan hêza wan
û bedewiya kalepîran jî porên
wanî sipî bûyî ne.
30 Derbên ku birîndar dikin, xe-
rabiyê paqij dikin û kotek jî kûri-
tiyên hebûna hundirîn pak dike.

21 Dilê qiral di destê XU-
DAN de ye; mîna ava di
qenalê de berê wê, li gor xwestina
xwe duguherîne.
2 Mirov dibêje qey her rêyên ku tê
de diçe rast e, lê belê yê ku nêtan
diwezîne XUDAN e.
3 XUDAN ji pêşkêşiya qurbanên
ku pêşkêşî wî dikin ve zêde-
tir, dixwaze ku maf û dadmendî
bê cîh.
4 Nêrînên kanc û dilê bi kubir,
çira xeraban, guneh e.
5 Ramanên yê jîr tim dibe bere-
ketê; lê belê her zilamê ku dile-

zîne, tim ber ve xizaniyê ve baz
dide.
6 Serweta ku bi dek û dolaban ve
hatiye kirin; mîna mijê derbasî ye
û dafika mirinê ye.
7 Zordestiya xeraban, wan dimale
û dibe, ji ber ku xwe nadin aliyê
kirina ya rast.
8 Rêya kesê bi sûc çivdayî; lê ki-
rinên kesê pak jî rasterast in.
9 Bi pîreka şerkir re rûniştina li
malekê ji rûniştina li quncîka xanî
xerabtir e.
10 Ya ku xerab can davêje, xerabî
ye; tu heyfa wî li kesekî nayê.
11 Dema bi yê qerfok re bê pe-
kandin, kesê çavzîq baqil dibe û
yê zaniyar ji hînkirinê, zanînê ve
qezenc dike.
12 Yê bi dad e, bi balkêşî çavnêri-
yê li mala yê xerab dike û xeraban
ber bi têkçûnê ve dibe.
13 Dê bersiva qêrîna kesê ku guhê
xwe li qêrîna xizanan girtiye, nê
dayîn.
14 Xelata bi dizîka hatiye dayîn
hêrsê û bertîla ku hatiye xistinî
paşlê jî xezeba bi hêrs aş dike.
15 Dema heq bê cîh, kesê rast
kêfxweş dibe; lê belê yê fesadkir
jî dikeve toqînê.
16 Mirovê ku ji eqlî selîmiyê dûr
bikeve, xwe di nava miriyan de
dibîne.
17 Yê ku zebûnê zewqa xwe ye,
xizan dibe; kesê zebûnê xemr û
zeytê ye jî dewlemend nabe.
18 Kesê xerab fîdya yê rast e û
xayîn jî ya durist e.
19 Li çolê jiyîn, jiyana bi pîreka
dil teng dike û şerkir re qenctir e.
20 Mala zaniyar bi zeyt û malên
biqîmet ve tijî ye,
lê yê bêaqil jî malê xwe mîna bide
agir û di ber bayê bênderê de ba
bike direşîne.
21 Yê ku li pey rastî û hezkirinê
ve baz dide, jiyan, rastî û bilin-
dahiyê dibîne.
22 Kesê zaniyar êrîşî bajarê xwur-
tan dike û keleha ku pê ewle ne
xera dike.
23 Yê ku bi dev û zimanê xwe
bigire, canê xwe ji asîwê ve di-
parêze.
24 Yê bixirûr, kanc û qerfok: Vana
navê mirovê pirr qurreye ne.
25 Xwesteka teral wî dibe mirinê,
ji ber ku destên wî ji şuxilê ve di-
revin.
26 Di tûmiya rojê de xwestekên
xwe rêz dike û disekine; lê belê
kesê rast, naparêze, dide.
27 Qurbana ku yên xerab pêşkêş
dikin erjeng e; hela gava vêya bi
nêtxerabî pêşkêş bikin.
28 Şahdeyê derewçîn tune dibe;
lê şahdeyiya mirovê ku guhdarki-
rinê dizane, baweriyê dide.
29 Kesê xerab, xuyaniyek bi xurtî
didin xwe; lê belê mirovê xawênî
jî ji rêya ku girtiye bawer e.
30 Li hemberî XUDAN zaniyarî
nîne û aqil nîne û şîret jî nîne.

31 Hespê bona roja şerê amade
digirin, lê belê yê ku serfiraziyê
peyde dike, XUDAN e.

22 Navê qenc ji serweta me-
zin, birêzî ji zîv û zêran
ewletir e.
2 Aliyê wekhev yê xizan û dewle-
mend ev e: XUDAN, herduyan jî
afirand.
3 Kesê baqil dema xeterê dibîne,
xwe vedişêre; lê yê çavzîq jî xwe
davê pêşiyê û xisarê dibîne.
4 Xelata tirsa XUDAN û dilniz-
miyê, serwet, bilindahî û jiyan e.
5 Rêya kesê xerab bi kelem û
dafikan ve tijî ye; yê ku dixwaze
canê xwe biparêze, ji vana ve dûr
disekine.
6 Zarok li gor rêya ku bigire me-
zin bike; gava pîr bibe jî ji wê
rêya naqete.
7 Dewlemend ji xizanan re dibe
serwer û yê deyn distîne, dibe
qûlê yê ku deyn dide.
8 Yê fesadiyê diçîne, derdan
radike[1] û çoyê xezeba wî tune
dibe.
9 Yê comerd tê pîroz kirin; ji ber
ku xwarina xwe bi xizanan re par
dike.
10 Yê qerfok biqewirîne, dê şer
biqede û dê dawiya keftûleft û
biçûkdîtinan were.
11 Yê ku ji dilpaqijiyê û gotinên
xweş hez dike, hevaltiya qiral qe-
zenc dike.
12 XUDAN çavnêriyê li zanînê
dike û wê diparêze û gotinê kesê
xayîn jî bi ser û binî dike.
13 Teral dibêje ku: Ji der ve şêr
heye, ger ez derkevim kuçê, dê
min perçe bike!
14 Devê pîreka kuçê mîna kortala
bêbinî ye; yê ku rastî xezeba XU-
DAN bên, dikevin wir.
15 Bêaqilî di kesitiya zarok de ye;
ger bi ço bê perwerde kirin, dê ji
bêaqiliyê dûr bikeve.
16 Dawiya kesê ku bona serweta
xwe mezin bike, xizan diperçiqî-
ne û yê xelatan dide dewlemen-
dan xizanî ye.
17 Guh bide, gotina zaniyaran
guhdarî bike û hînkirinên min
neqşî dilê xwe[2] bike!
18 Ger tu gotinên min di dilê xwe
de veşêre, tuyê kêfxweş bibe; bila
ew tim di lêvên te de amade bin!
19 Bona ku tu bi XUDAN ve
ewle be, îro vana ji te re, belê, ji
te re didim xuyanî kirin.
20 Bona te sî gotinî[3] nivîsandim,
gotinên zanîn û şîretan...
21 Ûsa ku, tu bi sozên ewlekar
û rast bizanibe; bi vî awayî ber-
siveki ewlekar bide, ji yê ku te
şandiye re.

1 Dirûne.
2 Hişê xwe.
3 Sî gotin, an jî: Gotinên bi qîmet.

22 Yê xizan, ji ber xizanbûna wî
tazî meke û di dadgehê de zordes-
tiyê li yê zebûn meke.
23 Ji ber ku, dê XUDAN doza
wan hilgire û canê kesên ku wan
tazî kirine bistîne.
24 Bi kesê bêxû re hevaltiyê
meke; bi yê ku zû hêrs dibe re
dernekeve rê.
25 Ya na tuyê hînî rêyên wî be û
canê xwe di nava dafikê de bibî-
ne!
26 Bi dest şidandinê ve ji kefîltiya
deynê yekî din bireve.
27 Ger perê te yê ku tu bide tune
be, çima ew dest deynin heta ser
doşega bin te jî?
28 Cîhê kevirên sînorê, yên ku
bapîrên te tirxan kiribûn negu-
here.
29 Ma tu yekî di karê xwe de hos-
te ye dibîne? Yê ûsa ne ji kesên
rêzî, heta ji qiralan re jî xizmetê
dike.

23 Ger tu bi serokekî ve li
xwarinê rûnê, bala xwe
bide tiştên ku datînin ber te.
2 Û gava tu zilamek bi xwestek
be, kêrê bide qirika xwe.
3 Bila canê te xwarinên wî yên
bi tahm nekişîne, ji ber dibe ku
di paşî xwarineke ûsa de fenekî
hebe.
4 Bona dewlemendiyê nelebite û
nesekine, vêya ji hişê xwe derxîne.
5 Serwet, heta vekirin û girtina
çavan tune dibe, bi bazik dibe û
mîna qertelê difire ezmanan.
6 Xwarina ku nekes dide nexwe
û bila canê te, çerezên wî yên bi
tahm nekişîne!
7 Ji ber, hisabê her tiştê ku te xwa-
riye dê bigire, ji te re: Bixwe, ve-
xwe! dibêje, lê belê dilê wî ne li
aliyê te ye.
8 Tuyê pariyek xwarina ku te xwa-
riye jî verşe û gotinê xweş yên ku
te gotiye jî dê li valahiyê biçe.
9 Bona şîretdana bêaqil nexebite,
ji ber ku eqlî selîma di gotina te de
ye, biçûk dibîne.
10 Cîhê kevirên sînorê yên kevin
neguherîne û dest li zeviyê sêwi-
yan nede!
11 Ji ber ku Xelaskerê[1] xwurt e;
ew, doza wan li hemberî te dajo.
12 Hînkariyê[2] neqşî dilê xwe bike
û guh bide gotinên zanyariyê.
13 Ji perwerde kirina zarokê xwe
jî nemîne; ger tu bi dar jî li wî
bixe, ew namire.
14 Tu bi dar lêxe û tuyê canê wî,
ji qebrê ve xelas bike.
15 Lawê min, ger tu dilbizaniyar
bibe, dê dilê min jî kêfxweş bibe.
16 Û dema lêvên te rast biaxifin,
dilê min jî dicoşe.

[1] Xelaskerê wan: Bi Îbranîtî Goel hîm nêzîkî û hîm jî xelaskeriyê dide xuya kirin.
[2] Perwerde, an jî: Îkazan.

17 Bila dilê te çavnebariyê ji gunehkaran re neke; lê bila tim û tim di tirsa XUDAN de bijî.
18 Bi vî awayî, dê hatinek te hebe û hêviya te vala dernakeve.
19 Lawê min, guhdarî bike û zaniyar be û dilê xwe di rêya rast de bigire.
20 Bi yên ku xemra zêde vedixwin û bi pirxwurên zebûnê goştê ne re hevaltiyê meke.
21 Ji ber ku kesê serxweş û pirxwur xizan dibin û tevizandin jî paçikan li mirov dike.
22 Guh bide gotinên bavê ku jiyanê daye te û dema diya te pîr bibe, wê biçûk nebîne.
23 Rastiyê bikire û nefiroşe, aqil, zaniyarî û perwerdê jî.
24 Bavê kesê rast, dicoşe, heta ku bicoşe û bavê lawê ku, bi zaniyariyê dike, kêfxweş dibe.
25 Bila dayik û bavê te, bi te re bicoşin û ya ku te aniye dinê, bila kêfxweş bibe!
26 Lawê min, dilê xwe bide min û bila çavên te ji rêyên min ve kêfê bistînin!
27 Ji ber ku fahîşe kortalek kûr û pîreka bêexlaq jî bîrek teng e.
28 Belê, mîna rêbir di kemînê de disekine û pirr zilaman ji rê ve derdixe.
29 Axîn ya kê ye û waxîn ya kê ye? Keftûleft yên kî ne? Gazinc yên kî ne? Birînên belesebep yên kî ne? Sorbûna çavan yên kî ne?
30 Kesê ku bona vexwarina xemrê rûniştine û ranabin, yên ku dê herin ceribandina xemra gewez in.
31 Li rengê xemrê yê gewez, di qedexê de şewledana wê, ji qirikê ber bi jêr ve herikandina wê nenihêre.
32 Di dawiyê de mîna maran dev lê dike û mîna margîskê vedide.
33 Dê çavên te tiştên xerîb bibînin, dilê te tiştên rêşaş bibêje.
34 Û tu yek caran dibêje, qey ez di nava behrê de û carna jî, li ser sitûna keştiyê ve dirêj bûme!
35 Û tuyê bibêjî: Li min xistin, lê belê neêşiyam, lêxistin, lê belê hayê min jê çênebû. Bona ku dîsa vexwim, ka ez ê kengê hişyar bibim?

24 Dil nebijîne xeraban û nexwaze ku tu bi wan re be.
2 Ji ber ku dilên wan pêşniyara zordestiyê dikin û lêvên wan qala asîwan dikin.
3 Xanî bi zaniyarî tê ava kirin û bi aqil tê zeximandin.
4 Û bi saya zanyariyê odeyên wê û bi her cûreyî kûtalên bi qîmet û xweşik ve tijî dibin.
5 Mirovê zaniyarî ji hêzê û mirovê zana ji hêza dijwar sereta ye[1].

[1] Septûaginta: Zaniyarî ji hêzê. Zanin ji hêza dijwar sereta ye, bi Îbranitî. Zaniyar xwurt dibe. xwediyê zaninê hêza xwe zêde dike.

6 Ji ber bona şer rêbaz û bona
qezenc kirina serfiraziyê jî gellek
amojker hewce ye.
7 Bona ehmeqan zaniyarî, qasî ku
negihêjin bilind e, di sazûmana
bajêr de devê xwe venake.
8 Ji kesê ku pêşniyara xerabiyê
dike re, fitne dibêjin!
9 Pêşniyarên bi ehmeqî guneh in
û her kes ji mirovê qerfok ve er-
jeng dibe.
10 Ger tu di roja tengasiyê de me-
tirsiya xwe winda bike, dibe ku
hêza te kêm e.
11 Yên di xetera mirinê de ne xe-
las bike û yên ku li ber mirinê ne
biparêze!
12 Ger tu bibêjî:
A vay, bi vêya nizanîbûm. Ma yê
ku bi dilê mirovan dizane, qey pê
nahêse?
Û yê ku canê te diparêze, qey
fêhm nake? Qey berdêla kirina
her kesî nake?
13 Lawê min, hungivê bixwe, ji
ber ku qenc e û hungivê dakirî
bona pidûyan şêrîn tê.
14 Zaniyarî jî bona canê te ûsa ye,
pê bizane.
Ger tu zaniyariyê bibîne, dê hebû-
nek te bibe
û hêviya te li valahiyê dernakeve.
15 Ya zilamê xerab, li ber mala
kesê rast nekeve kemînê, dest bi
xerakirina xaniyê wî neke.
16 Ji ber ku kesê rast, heft cara
bikeve jî dê dîsa rabe, lê belê yên
xerab, di asîwê de têk diçin.
17 Bi ketina neyarê xwe dilxweş
nebe û bi tilpekîbûna wî kêfxweş
nebe.
18 Ya na, dê XUDAN bibîne û
kêfxweş nebe û hêrsa wî yî li dijî
neyarê te ye, dê aş bibe.
19 Ji yên ku xerabiyê dikin re
nexeyide û nekesire; xweziya
xwe jî pê yê xerab neyne.
20 Ji ber ku hatina xeraban tune
ye, ji ber ku dê çira wan vemire.
21 Lawê min, ji XUDAN û qiral
bitirse; bi yên ku li dijî wan serî
hildane re hevaltiyê neke.
22 Ji ber ku ew, nişka ve rastî
asîwê tên û kî dizane ku dê çi be-
layan bînin serê mirovan?

*Methelokên din yên Zaniyaran*

23 Ev jî gotinên zaniyaran in:
Dema daraz kirinê alî girtin, ne
qenc e.
24 Dadgerê ku ji yê xerab re
dibêje: Tu bêsûc î! Ji aliyê gelan
ve tên lanet kirin, ji aliyê netewan
ve tên şermandin.
25 Xwezî li yê ku, kesê bisûc
mehkûm dike! Û her kes wî ji dil
û can pîroz dike.
26 Bersiva durist, nîşana hevalti-
ya rasteqîn e[1].
27 Pêşiyê li der ve karê xwe bi-
qedîne û zeviya xwe amade bike;
dawiyê xaniyê xwe ava bike.

[1] Bi Îbranîtî: Yê bersiva rast bide, dê lêvan ramûsine.

28 Li dijî kesekî din, bê sedem
şahdeyiyê neke û bi lêvên xwe ve
nexapîne.
29 Gotina: Tiştên ku wî li min ki-
rine, ez ê jî ji wî re bikim, ez ê
berdêla kirinên wî bidim wî; ne-
bêje.
30 Dema ez ji zeviya yê teral û ji
rezê kesê bêyî eqlî selîmê ve der-
bas bûm,
31 Û dîtim ku, gîhayên beyar û
stiriyan her alî girtine û dîwarê
kevirî jî xera bûbû.
32 Û li ser tiştên ku dîtime kûr fi-
kirîm, ji tiştên ku temaşe kirime
fêre girtim.
33 Hinek xew hinek hênijîn, bona
bi xewê ve çûyînê hinek dest û
mil girêdan,
34 Tuneyî mîna rêbirekî û xizanî
mîna êrîşkirekî bi ser te ve tên.

*Beşa Duwemîn ya Methelokên Silêman*

25 Yên ku li pêy vana ne jî
methelokên Silêman in.
Zilamên Hîzkiya yê qiralê Cihûda
vana berhev kirine.
2 Em, bona tiştê ku veşartî hiştine
Xwedê û bona ku vana eşkere di-
kin jî, qiralan pîroz dikin.
3 Mîna bilindahiya ezman û kûriti-
ya erdê, yên ku di aqilê qiralan de
derbas dibin jî nayên texmîn kirin.
4 Gava gûhesin ji zîvê ve tê cuda
kirin, tiştê ku zêrker bineqşîne
dimîne.
5 Gava tu xeraban ji hizûra qiral
ve dûr bixîne, texta qiral bi dadiyê
ve tê zeximandin.
6 Li cem qiral xwe bilind neke, di
nava mirovên girîng de bona cîh
girtinê nexebite.
7 Ji ber, heta ku qiral te li ber
esîlekî bigre û daxe jêr, çêtir e ku
ji te re bibêje:
Were jor!
8 Bi dîtinên xwe hema serî li
dadgehê nexe, ji ber ku yekî
din dikare te bişermîne, dawi-
yê tuyê nizanîbe ku ka tuyê çi
bike.
9 Doza xwe raste rast bi cîranê
xwe ve bibîne; lê belê razê yekî
din nede xuyanî kirin.
10 Ya na, yê ku bibihîze, dikare
te bişermîne û navê xerab dev ji
histuyê te bernade.
11 Gotina ku di cîhê xwe de tê go-
tin, mîna sêva zêrîn ya di neciran-
dinên zîvî de ye.
12 Guharê zêrînî an jî xemilekî
zêr çi be; pekandina zaniyaran
jî, bona guhê ku guhdarî dike,
ûsa ye.
13 Di dirûnê de hênikayiya
berfê çawa be, şandiyê ewle
jî, bona kesên ku wî şandine
ûsa ye.
Yekî ûsa, can tevî canê efendiyên
xwe dike.
14 Ewra bê baran û ba çawa be;
kesê ku pesnahiya xwe bi xelata
ku nedaye dide jî ûsa ye.

15 Bi sebir, heta hukûmdarek jî
tê qanih kirin û zimanê şêrîn ber-
xwedana herî xwurt[1] dişikîne.
16 Gava te hungivê dît, heta ku tu
dikare bixwe, ger tu zêde bixwe,
tuyê verşê.
17 Kêm û kêm here mala
cîranê xwe, ya na tuyê wî aciz
bike û kerihandina wî qezenc
bikî.
18 Mirovê ku li hemberî kesekî
din şahdeyiya derewîn dike; mîna
gurz, şûr an jî tîra tûj e.
19 Di roja teng de bi xayîn ve
ewle bûn, mîna bi lingê kûd an jî
diranê kurmî ve ewlebûn e.
20 Zilamê di roja sar de qeftanê
derdixîne û soda ya ku li ser sîrkê
her çawa be, yê ku ji dilekî bi derd
re distirê jî wusa ye.
21 Ger neyarê te birçî bûbe, wî têr
bike û ger tî bûbe, avê bidê.
22 Ji ber ku bi kirina vêya, tuyê
wî şermezar bikî[2] û dê XUDAN
te bi xelat bike.
23 Bayê bakur çawa ku baranê
tîne, zimanê tawanbarî dike jî rê
li nêrînên bi hêrs vedike.
24 Di koncala xanî de rûniştin,
bi pîreka şerkir ve di yek malê de
rûniştinê ewle ye.
25 Bona canê kesê tî bûyî ava sar
çi be; nûçeya qenc ya ku ji welatê
dûra ve tê jî ûsa ye.
26 Kesê rast, yê ku li ber xerab
bes kiriye; mîna kaniya ava wê
şêlo, mîna bîra ku herimiye ye.
27 Zêde hungiv xwarin ne
qenc e; lê belê lêgerîna bilindahi-
yê jî ji mirovan re giran e.
28 Kesê ku nikare çavdêriyê li
xwe bike; mîna bajarê bê birc, yê
xera bûyî ye.

26 Çawa ku di nava havînê de
berf û di dirûnê de jî baran
ne li cîh be, bilindahî jî li bêaqil
ve nayê.
2 Mîna çûkreş û hecîreşka ku
bi der û hêl ve difire, naleta ku
nehatiye heq kirin jî ûsa ye, nagire.
3 Ji hesp re qamçî, ji ker re hefsar û
ji pişta bêaqil re jî dar hewce dike.
4 Li gor ehmeqiya wî bersivê
nede yê bêaqil, ya na, tuyê jî bibe
mîna wî.
5 Li gor ehmeqiya wî bersivê bide
yê bêaqil, ya na, dê xwe mîna za-
niyarekî bibîne.
6 Yê bi destê xwe nûçeyê ji bêaqil
re dişîne, mîna yekî ku lingê xwe
jê bike, bi xwe xisarê dide xwe.
7 Di devê yê bêaqil de methelok,
mîna pêlên zilamê kûd, yên ku
berjêrî kiriye ne.
8 Mirovê ku ji kesê bêaqil re hur-
metê dike, mîna kevir bi qanikê
ve girêdan e.

1 Berxwedana herî xwurt: Bêje bi bêje, hestiyê wî.

2 Wî şermezar bikî: Bi Îbranitî, tuyê pêtan li ser serê wî bibarîne.

9 Di destê serxweş de darê bi ke-
lem çi be, metheloka di devê yê
bêaqil de jî ûsa ye.
10 Tîrvanê ku, tîrê xwe li rast û
çepê direşîne çi be; yê ku serxweş
an jî bêaqilê ku di rê de derbas
dibe bi mişe digire jî ûsa ye.
11 Bêaqilê ku dîsa ehmeqiya xwe
dike; mîna kûçikê ku vedigere
verşiya xwe ye.
12 Tu yekî ku xwe zaniyar dibîne
dinase? Heta bêaqil jî, ji wî zêde-
tir hêviyê dide.
13 Yê teral: Di rê de şêr heye, di
kuçan de şêr digere, dibêje.
14 Mîna deriyê ku li ser menteşê
xwe dizivire; yê teral jî di nava li-
vînê xwe de dizivire û disekine.
15 Teral destê xwe di beroşê de
dadike û aciz dibe ku dîsa bibe
devê xwe.
16 Teral xwe ji heft kesê biaqilî
bersivê didin ve, hîn jî zaniyar di-
hesibîne.
17 Kesê ku beşdarî şerê têkiliya
wî pê nîne dibe, mîna yê ku bi
guhê kûçikê di rê de derbas dibe,
digire ye.
18 Dînek yê tîrên bi agir û kuştin
diweşîne çi be, 19 yê ku cîranê
xwe dixapîne û dibêje: Heneka
kirim! jî ûsa ye.
20 Gava êzing biqede, agir ve-
dimire; dema yê kustûpistê dike
tune dibe, şer aş dibe.
21 Bona pêtê komir, bona agir
êzing çi be, sor kirina keftûleftê jî
bona şerkir ûsa ye.
22 Kustûpist mîna pariyê şêrîn e û
ta diçe heta hundirê mirov.
23 Lêvên agirdar û dilê xerab;
mîna qaba axînî ya ku bi gûhesina
zîvê ve hatiye suwax kirin e.
24 Kesê dilê wî bi kerihînê ve
tijî ye, bi gotinên xwe ve bona
veşartina nêta xwe duşuxule;
lê belê hundirê wî tijî fenekî ye.
25 Bi gotinên wî, yê xweş ve
nexape; ji ber ku di dilê wî de heft
tiştê erjeng hene.
26 Ger nefrîna wî bi xwe bi fendê
ve binixume jî, li ber civakê xera-
biya wî eşkere dibe[1].
27 Yê ku bîra yekî din dikole, bi
xwe dikeve wê û yê ku kevir di-
gindirîne, di bin wê de dimîne.
28 Zimanê derewçîn, ji kesê ku
êşandiye dikerihe û ji zimanê
çaplûsiyê dike, têkçûn tê.

27 Bi sibê ve pesnahiya xwe
nede, ji ber tu nizane ku dê
roj çi bîne.
2 Bila pesnahiya te, ne devê te,
kesên din bidin û ne lêvên te, yê
biyan bide.
3 Kevir giran e, qûm barek e; lê
belê kişkişandina yê ehmeq, ji her
duyan jî girantir e.
4 Hêrs zalim û keribîn dijwar e; lê
belê kî dikare li hemberî çavneba-
riyê bisekine?

1 Vedibe, an jî: Derdikeve holê.

5 Pekandinek eşkereyî, ji hez kiri-
na ku bi dizîka ye qenctir e.
6 Ramûsanên neyaran xapînokî
ne, lê belê hevalê te, bona qenciya
te birîndar dike.
7 Canê mirovê têr, hungivê jî
nakişîne; lê ji mirovê birçî re her
tiştê tahl şêrîn e.
8 Civîkek li dûrî hêlîna xwe mabe,
çawa be; mirovê li dûrî welatê
xwe mayî jî ûsa ye.
9 Bêhna xweş û buxur dil kêfxweş
dike û şîreta ku heval bide, ji mi-
rov re şêrîn tê.
10 Dev ji hevalê xwe û hevalê bavê
xwe jî bernede û roja ku tu rastî
asîwê bê, neçe mala birayê xwe;
cîranê te yî nêzîkê, ji birayê dûra
ve ewletir e.
11 Lawê min, bi zaniyarî bike
ku, bila dilê min kêfxweş bibe,
da ku, bersivê bidim yê ku min
dişermîne.
12 Kesê baqil dema xeterê dibîne,
xwe vedişêre; lê yê çavzîq jî xwe
davêje pêşiyê û dixesire.
13 Kincê mirovê ku ji nenasê xwe
re bûye kefîl bigire; ger bona pîre-
ka biyanî vêya dike, kincê wî bi
rehîntî bistîne.
14 Silava bi galegal, ya ku sibehê
ji cîran re tê dayîn, kufir tê hesi-
bandin.
15 Galegala pîreka şerkir, mîna
dilopên di roja bi baran de dengê
wan nayê birîn in.
16 Bona sekinandina pîrekekî
ûsa şitexlîn, mîna ba an jî rûn di
nava lepan de sekinandinê ye.
17 Hesin hesinan tûj dike û mirov
jî rûyê mirovan.
18 Yê ku darê hêjîrê dipejinîne,
dê mêwa wê bixwe û yê ku xiz-
metê ji efendiyê xwe re dike, dê
bê bilind kirin.
19 Av çawa ku rû ji rû re dide
xuyakirinê, dil jî hundirê mirovan
dide xuya kirin.
20 Warê mirin û têkçûnê, têrî mi-
rovan nabe; çavê mirovan jî qet
têr nabe.
21 Zêr di ocaxê de û zîv di qaba
hulandinê de tên safî kirin û mi-
rov jî, bi pesnahiya ku distîne ve
tê ceribandin.
22 Ger tu yê ehmeq, tevî genim di
curnê de, bi mîrkut ve bukute jî ji
ehmeqiya xwe xelas nabe.
23 Qenc li dewara xwe binêre,
bala xwe bide gayên xwe.
24 Ji ber ku dewlemendî ne baqî
ye û ma tac ji nifşeyê derbasî
nifşeya din dibe?
25 Dema mêrg bê çinîn û gîhayê
nû derkeve û gîhayên li çiyê bên
hevdan.
26 Berxik bona kincên te ne û nêrî
jî bibin berdêla zeviyê.
27 Û şîrê bizinan ne tenê têra têr-
kirina te,
têra têrbûna maliyan û xizmet-
karên te jî dike.

28 Kesê xerab, kesî ku bera
wî bide tune be jî direve;
lê yên rast jî mîna şêrê ciwan bi
metirsî ne.
2 Welatê ku serî hildide bi pirr serî
dibe; lê belê kesê biaqil û zaniyar
sazûmanê pêk tîne.
3 Xizanê ku zordestiyê li yê xizan
dike, mîna rejnebarana ku zad
wêran dike ye.
4 Yê ku zagonê biterikîne, pesna
yê xerab dide; lê yê bîne cîh jî li
dijî xerab radibe.
5 Yên xerab, ji dadiyê ve fêhm
nakin; lê yê berî bidin XUDAN jî
bi her alî ve fêhm dikin.
6 Xizanek durist bûn, ji mirovê
bi fenekiyê ve dewlemend bûye
ewletir e.
7 Lawê ku Zagona Pîroz bîne
cîh, biferaset e; lê yê ku bi pirr-
xweran re dibe heval jî bavê xwe
dişermîne.
8 Kesê bi selef û qebaletiyê mal
beşdarî malên xwe kiriye, vêya
bona yê ku heyfa wî li xizanan tê,
dide ber hev.
9 Dua kesê ku guhê xwe ji Zagonê
re girtiye jî erjeng e.
10 Kesê ku berê mirovên durist
dide rêya xerab, dê bi xwe bikeve
kortala ku kolaye. Lê belê dê yên
gotin û hebûna wan yek in, qenci-
yê bi mêrasî bigirin.
11 Dewlemend, dibêje qey ew za-
niyar e, lê belê xizanê baqil, hun-
dirê wî dixwîne.
12 Serfiraziya rastan bi coşînê ve
tê pîroz kirin; lê belê gava yên xe-
rab bibin serwer, mirov li qulekî
revê digerin.
13 Yê ku gunehên xwe
veşêre serfiraz nabe; lê yê bîne zi-
man û dev jê berde jî dilovaniyê
dibîne.
14 Xwezî li yê ku xwe ji gunehan
ve vedikişîne; lê yê inyadê bike jî
dê têkeve asîwê.
15 Kesê xerab, yê ku rêvebiriyê ji
gelê xizan re dike, mîna şêrê du-
hurme û hirçê êrîşker e.
16 Aqilê serokê xedar kêm e! Lê
temena yê ku ji qezenca bi neheqî
erjeng dibe jî dê dirêj be.
17 Yê ku ji mirov kuştinê ve eza-
bê ûcdanê dikişîne, dê heta qebrê
bireve; bila tu kes alîkariyê bi wî
re nekin!
18 Yê ku enî vekirî bijî, dê xelas
bibe, lê yê bêrêtî kiribe, dê nişka
ve rastî têkçûnê bibe.
19 Nanê kesê ku zeviyê dajo zêde
ye; lê yê ku li pêy xeyalan baz
dide jî têrî xeyalan dibe.
20 Kesê ewlekar, digihêje bere-
ketê; lê yê ku bona dewlemend-
bûnê can dide, ji asîwê ve xelas
nabe.
21 Guhdana xatirê ne qenc e, ji
ber ku mirov heta ji bo pariyek
nan jî sûcê dike.
22 Yê çikot li pêy serwetê baz
dide û nafikire ku dê rastî xizanî-
yê bê.

23 Yê bi kesekî din ve dipeke, da-
wiyê ji yê ku çaplûsiyê dike zêde-
tir ecibandinê qezenc dike.
24 Yên ku tazî kirina dayik an jî
bavê xwe guneh nahesibîne; bi
rêbir re yek e!
25 Yê çavbirçî şer derdixe; lê yê
bi XUDAN ve ewle ye jî di nava
zêdeyiyê de dijî.
26 Yê ku bi xwe ewle ye, bêaqil
e; lê yê ku bi zaniyarî dike, dê di
ewlekariyê de be.
27 Tu kêmasiya kesê ku bide xi-
zanan nabe; lê yê ku xizanan ji
nedîtiyê ve tê jî rastî komekî na-
letan dibe.
28 Dema yên xerab dibin serwer,
mirov li qulekî revê ve digerin; lê
belê dema yên xerab winda bibin,
yên rast zêde dibin.

29 Yê ku li ber gellek pekan-
dina hîn jî serhişkiyê dike,
nişka ve dê rastî têkçûnê bibe,
çare nîne.
2 Dema kesên rast zêde dibin, gel
kêfxweş dibe; dema kesê xerab
dibe hukimdar, gel dinale.
3 Yê ku ji zaniyariyê hez
bike, dê bavê xwe kêfxweş
bike; lê yê ku bi fahîşeyan ve he-
valtiyê bike, hemû malê xwe win-
da dike.
4 Qiralê bi dadî rêvebiriyê dike,
welatê xwe li ser pêlan disekinî-
ne; lê belê yê ku xercên giran
datîne, xera dike.
5 Kesê ku ji cînarê xwe re çaplû-
siyê dike, dafikê ji wî re ava
dike.
6 Serîhildana yê xerab, ji wî re
dibe kemîn; lê belê kesê rast jî
murxan dibêje û kêfxweş dibe.
7 Kesê rast mafê xizanan dide;
kesê xerab nizane heq û hiqûq çî
ye.
8 Kesên qerfok heta bajaran jî
tevlihev dikin, lê yên zaniyar jî
hêrsê aş dikin.
9 Ehmeqê ku doza wî bi kesê za-
niyar re ye, dê bixeyide, qerfan
bike û rehetiya wî nîne.
10 Kesê tî yî xwînê bûne, ji kesê
durist ve dikeribin; lê belê yên
rast jî canê wî diparêzin.
11 Hêrsa yê bêaqil ji bona teqînê
amade ye; lê belê yê zaniyar hêrsa
xwe disekinîne.
12 Ger hukûmdar guh bide de-
rewan, dê hemû wezîfedarên wî jî
bibin xerab.
13 Nuxtikek wekhev ya zordest û
xizan heye: Yê çavên her duya jî
vedike XUDAN e.
14 Texta qiralê ku bi dadî rêvebi-
riyê li xizanan dike, dê her tim di
ewlekariyê de be.
15 Perwerdeya bi dar, zaniyariyê
dide qezenc kirin; lê belê zarokê
ku bi serê xwe ve hatiye berdan jî,
dê dayika xwe bişermîne.
16 Dema yên xerab zêde bibin, dê
serîhildan jî zêde bibe; lê belê yên
rast, dê ketina wan bibînin.

17 Lawê xwe perwerde bike, ew ê
jî aramiyê bide te û dilê te xoşnûd
bike.
18 Gelê ku bêyî peyxama Xwe-
danî be, dê sînor nenas bibe.
Xwezî li yê ku Zagonê tîne cîh.
19 Dîl, tenê bi gotinê ve nayê per-
werde kirin; ji ber ku, fêhm bike
jî guh nadê.
20 Ma tu yekî ku gotina xwe na-
wezîne û diaxife dinasî? Heta
rewşa yê bêaqil jî ji ya wî zêdetir
hêviyê dide.
21 Yê ku ji zarokantiyê de dîlê
xwe şinek kiriye, ew di dawiyê de
dibe law.
22 Kesê bi hêrs, keftûleftê pêk tîne
û serîhildana kesê bêxû kêm nabe.
23 Kubir, mirovan biçûk dixîne;
lê dilnizmî jî birêziyê dide qezenc
kirin.
24 Neyarê canê kesê ku şirîkantiyê
bi dizan re dike, xwe bi xwe ye
û di dadgehê de sondê bixwe jî,
tiştê ku dizane nabêje.
25 Ji mirovan tirsîn dafik e; lê
belê yên ku bi XUDAN ewle ne,
dê di ewlekariyê de bin.
26 Yên ku dixwazin têkevin çavê
hukûmdar zêde ne, lê belê XU-
DAN e, yê ku dadiyê ji mirovan
re dike.
27 Yên rast ji neheqan ve erjengî
dibin û yên xerab jî ji kesê bi du-
ristî dijîn ve.

*Methelokên Agûr*

30 Gotinên Agûrê lawê Ya-
keyê Massayî:
Ev zilama ûsa dibêje:
Ez westiyam, ya Xweda, ez westi-
yam, ya Xweda û çikiyam[1]!
2 Bi rastî jî ez herî cahilê miro-
van im û di min de aqilê mirovan
tuneye.
3 Û ez hînî zaniyariyê nebûm,
bêyî zanîna di derheqê Yê Pîroz
de ye jî, me.
4 Ma kî derket ezmanan û daket
jêr? Ma kî bi lepên xwe ba da ber
hev? Yê ku avê bi kincê xwe ve
pêçandiye kî ye? Ma kî sînorên
dinê nîşan da? Navê wî çi ye û
navê lawê wî çi ye, ger tu dizanî
bibêje!
5 Her gotina Xwedê ewlekar e;
ew bona heçiyên ku xwe spartine
wî mertal e.
6 Tu tiştî tevî gotina wî neke, ya
na dê bi te re bixeyide û tuyê de-
rewîn derkeve.
7 Du tiştî ji te xwestim[2]; berî ku
bimirim, vana ji min neparêze:
8 Sixtekariyê û derewê ji min dûr
bigire, ne xizanî, ne jî dewlemen-
diyê bide min; nanê ku dikeve
para min bide, bes e.
9 Ya na ez ê ji zêdeyiyê, bi gotina:
XUDAN kî ye? te înkar bikim, an
jî, ji xizaniyê diziyê bikim û navê
Xwedayê xwe gemarî bikim.

1 Ev zilam ji Îtiêl re, ji Îtiêl û Ûkal re ûsa dibêje.
2 (Ya Xwedê), du tiştî ji te xwestim.

10 Keftûlefta dîl, ji efendiyê wî re neke, ya na dê li te naletê bîne û tuyê bisûc derkeve.

11 Kesên ûsa hene ku, naletê li bavê xwe dikin û qîmetê nadin diya xwe.

12 Kesên ûsa hene ku, di çavê xwe de paqij in, lê belê ji xerabiyên xwe ve pak nebûne.

13 Kesên ûsa hene ku, dibêjin qey kesî ji me seretatir nîne û ji jor ve li her kesî dinêrin!

14 Kesên ûsa hene ku, diranên wan şûr, çengên wan kêr e, xizan û belengazan daduqurtînin û ji rûyê erdê ve tune dikin!

15 Du keçê zîrov hene, navê wan: Bide, bide! ne. Sê tiştên ku qet têr nabin, çar tiştên ku qet nabêjin: Bes e! hene.

16 Qebir û rehma stewr, erdê têrî avê nabe û agirê ku nabêje: Bes e!

17 Dê çavê yê ku henekê xwe bi bavê xwe ve dike û gotina diya xwe biçûk dibîne, qelereşk birijînin û ew ê bibe xwarina sîqalkan.

18 Sê tiştê ku aqilê min nagihêje û çar tiştê ku ez fêhm nakim hene:

19 Rêya ku qertel li ezman de, rêya mar di zinarê de, rêya keştî di behrê de li pêy dihere. Û rêya ku zilam bi keça ciwan re tê de diçe.

20 Rêya pîreka ku zinê dike jî, ûsa ye:
Dixwe û devê xwe paqij dike. Û dawiyê jî: Tu sûcî nekirime, dibêje.

21 Rûyê erdê, di bin sê tiştî de dilerize û, çar tiştê ku nikare baldirêjiyê lê bike, hene:

22 Qiralbûna dîl û têrbûna bêwac;

23 Zewaca pîreka ku jê tê nefrîn[1] kirin û derbasbûna ku xizmetkar derbasî cîhê xanima xwe bibe.

24 Çar afirên biçûk hene ku karên wan bi gellek zaniyariyê ye:

25 Gêrik ne civakek xwurt in, lê belê ji havînê de xwarina xwe didin ba hev.

26 Bebir[2] jî ne civakek xwurt in, lê belê qulên xwe di kovikên zinaran de çê dikin.

27 Qiralê kuliyan nîne, lê belê gîvale bi gîvale pêş ve diçin.

28 Gumgumok heta bi desta jî tê girtin, lê belê di qesrê qiralan de jî heye.

29 Sê afirên ku meşa wan bi rewnaq e û çar afirên ku kirinên wan bi rewnaq e hene:

30 Şêrê herî xwurtê yê heywana ye û li ber tu tiştî bes nake.

31 Tajî, nêrî û qiralê ku li serê artêşa xwe ye.

---

1 Kerihîn, nefret.

2 Bebir: Ji malbata heywanên bi pêsîr, çermê wî bi şahnikî ye, goştxwar e.

32 Ger te mîna bêwacekî xwe bi-
lindtir kiribe, an jî pêşniyara xera-
ban kiribe, bisekine û bifikire[1]!
33 Ji ber ku, çawa gava şîr bê
meşk kirin[2] rûnê nivîşk û dema
şidandina poz, xwîn derkeve û
dema hêrs jî bê tevlihev kirin, şer
derdikeve.

*Methelokên Lamûel*

31 Gotinên Lemûelê Qiralê
Messayê; yên ku dayika wî
hînî wî kiriye:
2 Lawê min û lawê rehîma[3] min,
ma ez bibêjim çi? Lawê minî
bersiva qewlên min, ma ez bi-
bêjim çi?
3 Hêza xwe nede destê pîrekan,
ciwaniya xwe jî nede destê mehf-
kirên qiralan!
4 Vexwarina xemrê ne li gor qi-
ralan e, ya Lemûel, ne li gor
qiralan e! Bêrîkirina araqê, li
hukûmdaran nayê.
5 Ji ber ku gava vexwin, qaîde-
yan ji bîr dikin û mafê belengazan
dixwin.
6 Araqê bidin yê bêçare û xemrê
bidin kesê ku xemgîniyê dikişîne.
7 Bila vexwe ku, xizaniya xwe ji
bîr bike û bila êdî tunebûn û lawa-
ziya xwe di bîr nîne.
8 Devê xwe bona kesê ku mafê
xwe nikare biparêze û bona ajo-
tina doza bêkesan veke.
9 Devê xwe veke û bi dadî daraz
bike, mafê xizan û belengazan bi-
parêze.

*Pîreka Xawênî*

10 Kî dikare pîreka xawênî[4] bibî-
ne?
Ji ber ku qîmeta wê, zehf di ser
gewherê de ye.
11 Zilamê wê, ji dil bi wê ewle ye
û qezenca wî kêm nabe.
12 Pîrek ne bi xerabiyê, di tûmiya
jiyana xwe de bi qenciyê bersiva
wî dide.
13 Rîs û ketenê digere[5] û bi destê
xwe,
bi zewqek mezin dirêsîne.
14 Mîna keştiyên bazirganiyê ye,
xwarina xwe ji dûra ve tîne.
15 Û berî ku roj hilê radibe, xwa-
rinê dide maliyan û para xizmet-
karan dide.
16 Zeviyekê biryarî ber çavê xwe
dide û distîne; bi perê ku bi keda
destê xwe qezenc kiriye, rezekî[6]
diçikîne.
17 Kincên xwe li xwe dike û
hûçikên xwe hildikişîne, bi dil û
can dixebite.

1 Bisekine û bifikire: Bi Îbranîtî, destê xwe têxe devê xwe.
2 Tevlihev kirin.
3 Ber a malzaroka min.
4 Ayetên 31:10, 10-31 Di şiklê Akrostîşê de hatiye nivîsin. Yanê her rêz, bi dor, bi tîpek Îbranîtî destpê dike.
5 An jî: Dibîne.
6 Baxekî.

18 Dizane ku danûstendina wê bi
ber e; çira wê di tûmiya şevê de
natefe.
19 Bi destê xwe ve bi haletê risan-
dinê digire û di nava lepê xwe de
jî bi teşiyê digire.
20 Milên xwe ji belengaz re ve-
dike û destê xwe dirêjî xizanan
dike.
21 Dema berf dibare bona mali-
yan xem nake, ji ber ku du qat[1]
kincê her yekî hene.
22 Rûberên livînan dirêsîne; kin-
cên wê ji ketena mor û zirav e.
23 Zilamê wê bi kesên pêşhatiyê
welatê ne, rûdine û radibe, di sa-
zûmana bajêr de qenc tê nasîn.
24 Pîrek kincên ketenî yên ku
dirûtiye û piştikên[2] ku rêsandiye,
difiroşe bazirganan.
25 Bi hêz û xawên ve xemiliye û
bi ewlekarî li hatinê ve dinêre.
26 Ji devê wê zaniyarî diherike û
zimanê wê, qenciyan şîret dike.
27 Karên maliyên xwe dimeşîne
û teralî çî ye, nizane.
28 Lawên wê li ber wê radibin û
wê pîroz dikin, zilamê wê radibe
pesnê wê dide.
29 Dibêje: Pirr pîrekên ku karê
biesil çê dikin hene, lê belê tu ji
giştikî jî sereta ye!
30 Cazibe xapînokî û xweşikayî
vala ye; lê belê pîreka ku ji XU-
DAN re bi hurmet e, liyaqî pes-
nahiyê ye.
31 Yê ku destê wê li xwe heq ki-
riye bidin wê û bila bona kirinên
wê, di sazûmana bajêr de pesnê
wê bidin!

[1] Du qat, an jî: Sor.

[2] Şûtik.

# WAIZ

*Pêşgotin*

Pirtûka Waiz, cîh dide ramanên waizekî ku ji dil têdighîne ku jiyana mirovan çiqas kurt û bi nakokiyan ve tijî ye, neheqî û hêvîşikestina sedema wê nediyar û ya dawîn jiyan bi xwe tiştek "vala ye." Lê belê vî waiza bona fêhmkariya rêya Xwedê jî zehmetê kişand. Lê li berî vêya, şîreta zehf xebatê û heta ku bibe, bi dayînên Xwedê dilşabûniyê dide mirovan.

Gellekên van ramanan wekî nerênî xemgîniyê nîşan dibe. Lê belê ji ber ku di Kitêba Pîroz de cîh girtiye, dide xuya kirin ku Kitêba Pîroz qasî li van kesirandin û gumanan jî baldar be, bi pirr alî ye. Gellekan di mirêka Pirtûka Waiz de li xwe dinihêrin û xemrevînê dibînin û Kitêba Pîroz ya ku van ramanan belav dike, mîna vêya wateya hêviya Xwedanî ya kûra ku çavkaniya jiyanê ye jî kifş dike.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:26 | Lêkolîna wateya jiyanê |
| 3:1-22 | Dema her tiştî heye |
| 4:1-8:17 | Jiyan nabe ku her dem xweş be, bi zaniyariyê bijîn |
| 9:1-11:8 | Tu kes nizane ku dê di hatinê de çi bibe |
| 11:9-12:14 | Ji Xwedê re hurmetdar be û îtaet bike |

*Jiyana di bin Rojê de*

Zeb 90.2-12; Rom 8.20-22

1 Gotinên Waizê lawê Dawidê ku li Orşelîmê qiral e:
2 Valayê valayan e[1]! Waiz dibêje: Valayê valayan! her tişt vala ye!
3 Ma ji hemû keda ku di bin rojê de dikişînin, qezenca mirov çi ye?
4 Nifşeyek diçe û nifşeyek tê; lê belê dinya abadîn disekine. 5 Roj dihilê û diçe ava û baz dide cîhê xwe, cîhê ku lê dihilê. 6 Ba diçe başûr û dizivire bakur; dizivire, dizivire û diçe û ba zivirandina

1 An ji: Vîk û vala ye.

xwe dîsa dike. 7 Hemûya çeman
bi hundirê behrê ve diherikin, lê
belê behr tijî nabin; çem dîsa bi
cîhê ku lê diherikin, bi wir ve
diherikin. 8 Hemû tişt bi westan-
dinê ve tijî ne; lê mirov nikare wê
bibêje; çav bi dîtinê ve têr nabe û
guh bi bihîstinê ve tijî nabe. 9 Her
çi hebe, dê yê ku bibe ew be û her
çi hatibe çêkirin û di bin rojê de
tiştekî nû nîne. 10 Ma tiştekî ku
mirov bikaribe bibêje: Binêre, ev
tiştekî nû ye heye? Ji berê ve, ji
sedsalên ku berî me ne de çêbûne.
11 Nifşeyên berê di bîr de nayên
anîn; paşiyên ku werin jî dê di
nava yên ku li pêy wan bên, ne-
yên bîranîn.

*Zaniyariya mirovan vala ye*
1.Kor 1,19-21; 2,6-10

12 Ez Waiz; li Orşelîmê, li ser Îs-
raêlê ve qiral bûm. 13 Û dilê xwe
dam bona bi zaniyariyê lêkolîn û
pirsiyariya di derheqê heçî tiştên
ku di bin ezmanan de tên kirin:
ev zehmetek xerab e. Xwedê
wê, bona ku pê biştexilin daye
lawên mirov. 14 Hemû karên ku
di bin rojê de tên kirin dîtim û a
vay, hemû vala ne û xebata bona
girtina bayê ne. 15 Ya ku xwar e.
nayê serrast kirin û ya ku kêm e.
nayê hejmarê. 16 Bi dilê xwe re
hevpeyvînê kirim û gotim: A vay.
min ji yên ku berî min li Orşelîmê
ne zêdetir zanînê zêde kir û dilê
min ji hemûyan zêdetir zanyarî û
zanînê dît. 17 Û bona hînbûna za-
niyariyê û bona hînbûna dînitî û
hînbûna bêaqiltiyê dilê xwe dam;
fêhm kirim ku, ev jî bona girtina
bayê xebat e. 18 Ji ber ku di zani-
yariya zêde de kesera zêde heye û
yê ku zanînê zêde bike, kul û der-
dê zêde dike.

*Berhewayiya kêfxweşiyên Dinê*
Met 16,26-27; 1.Yûh 2,15-17

2 Min di dilê xwe de got: De
were, ez bi kêfxweşiyê te bice-
ribînim; qenciyê jî bibîne! û a vay,
ew jî vala ye! 2 Bona kenê gotim:
Dînitî ye, bona kêfxweşiyê jî: Ma ji
çi karî re dibe? gotim. 3 Bi gotina:
Bona ku di tûmiya rojên temena
xwe de di bin ezmanan de çêkin,
heta ku ya bona mirovan qenc e bi-
bînim, dema dilê min bi zaniyariyê
rê nîşanî min dida, ma ez çawa be-
dena xwe bi xemrê ve rawestînim û
bêaqiliyê çawa bigirim dest? di dilê
xwe de lêkolînê çêkirim. 4 Karên
mezin çêkirim; ji xwe re xaniyan
çêkirim; bona xwe rezan danîm[1];
5 bona xwe bexçe û parkan çêki-
rim û di wan de bi her celebî da-
rên mêwan çikandim; 6 bona ku
daristana dar tê de tête mezin kirin
avdan bikim, ji xwe re burkên avê
çêkirim; 7 kole û cariyan stendim û
koleyên min yên ku di mala min de

[1] Mêwan çikandim.

hatine dinê hebûn; him jî pirr malê
min, ganêrên min, dewarên min he-
bûn, ji yên heçiyên ku berî min li
Orşelîmê bûn, zêdetir bûn; 8 him jî
bona xwe zîv û zêr û xezîneyên qi-
ral û welatan dam hev û stranbêjên
jin û mêr û tiştên ku mirovan jê
zewqê digirin, pirr pîrekan ji xwe re
stendim[1]. 9 Bi vî awayî mezin bûm
û ji heçiyên ku berî min li Orşelîmê
ne zehf mezintir bûm; zaniyariya
min jî min berneda. 10 Û çi tiştên
ku xwestin, ji çavên xwe ve nepa-
rastim; dilê xwe ji tu kêfxweşiyê
ve negirtim; ji ber ku, bona hemû
keda min, dilê min kêfxweş dibû
û ji ber hemûya keda min ev jî bû
para min. 11 Û zivirîm û bona ku
li hemû karên ku destên min kiri-
ne û li keda bona kirinê kişandime
nihêrtim û a vay, gişt vala ye û bona
girtina bayê şuxul bû û di bin rojê
de tu qezenc tunebû.

*Zilamê bi zaniyarî jî mîna yê bêaqil dimire*

Zeb 49,7-21

12 Û bi gotina; bona ku ez zanyarî
û dînitî û bêaqilî bibînim zivirîm;
ji ber, ma zilamê ku li pêy qiral tê,
dikare çi bike? Tiştê ku ji zû ve
hatiye kirin! 13 Û dîtim, çawa ku
ronahî li ser tariyê ye, wusa zan-
yarî jî li ser bêaqiliyê ye. 14 Ça-
vên zilamê bi zanyarî di serê wî
de ne, lê belê yê bêaqil di tariyê
de dimeşe; tevî ku wusa ye fêhm
kirim ku, heçiyê tê serê hemûyan
yek e. 15 Û di dilê xwe de gotim:
Her çi tête serê bêaqil, dê ew were
serê min jî; ma wê gavê çima ez
bi zanyarî bûm? Û di dilê xwe de:
Ev jî vala ye! gotim. 16 Ji ber ku
mîna zilamê bêaqil, bona yê bi
zanyarî jî bîranîna abadîn nîne;
ji ber ku dê di rojên ku werin de
her tişt ji zûde bête ji bîrkirin. Û
zilamê bi zanyarî jî çawa mîna yê
bêaqil dimire!

*Berhewayiya Xebatê*

Lûq 12,13-21

17 Û ji jiyanê ve kerihîm, ji ber
ku karê di bin rojê de tête kirin
ji min re xerab hate xuyanîbûn;
ji ber ku gişt vala û bona girtina
bayê şuxul in. 18 Û ji hemû keda
ku di bin bayê de kişandime ke-
rihîm, ji ber ku ez ê wê ji zilamê
ku dê li pêy min were re bihêlim.
19 Û kî dizane, gelo dê ew bi
zanyarî be, an jî bêaqil be? Û dê li
ser hemû keda ya ku di bin rojê de
xwe bi zanyarî dabûm xuyakirin û
kişandibûm serweriyê bajo. Ev jî
vala ye! 20 Û ji berya hemû keda
ku di bin rojê de kişandime, bona
ku dilê min hêviya tiştekî meke,
wec dam aliyê din. 21 Ji ber, zi-
lam heye ku kedê bi hîkmetê, bi
zaniyariyê bi zanînê û bi serkef-
tinê ve dibe; lê belê wê ji zilamê

[1] Girtim, an jî: Peyda kirim.

di tê de kedê nekişandiye re bi
paritî dihêle. Ev jî valayî û xera-
biya mezin e. 22 Ji ber ku ji hemû
keda wî û ji tahba dilê wî ya ku
di bin rojê de kedê dikişîne çi ji
zilam re heye? 23 Ji ber ku hemû
rojên wî tenê derd û keda wî keser
e; bi şevê jî dilê wî rehet nake. Ev
jî vala ye!
24 Bona zilam ji xwarin û ve-
xwarinê û ji bi kedê canê xwe şa
kirinê qenctir tiştek nîne. Dîtim
ku, ev jî ji aliyê Xwedê ye. 25 Ji
ber ku, ma kî dikare bêyî wî bi-
xwe an jî zewqê bibîne? 26 Ji ber
ku Xwedê zaniyariyê û zanînê û
kêfxweşiyê dide zilamê ku li ber
wî qenc e; lê belê bona ku Xwedê
bide yê li ber wî qenc e, zehmeta
berhevkirin û komkirinê jî dide
sûckiran. Ev jî vala ye û bona gir-
tina bayê şuxul e.

*Dema her tiştî heye*
Wai 8,5-8.15-17

3 Dema her tiştî û di bin ezma-
nan de wexta her karî heye; 2
wexta bûyînê heye û wexta mi-
rinê heye; wexta çikandinê heye
û wexta rakirina yê ku hatiye çi-
kandin heye; 3 wexta kuştinê heye
û wexta şîfa dayînê heye; wexta
xerakirinê heye û wexta avaki-
rinê heye; 4 wexta girînê heye û
wexta kenînê heye; wexta li xwe
xistinê heye û wexta lîstinê heye;
5 wexta avêtina kevir heye û wex-
ta berhevkirina wan heye û wexta
himbêzkirinê heye û wexta ji him-
bêzkirinê vekişînê heye; 6 wexta
lêgerînê heye û wexta windakirinê
heye; wexta veşartinê heye û wex-
ta avêtinê heye; 7 wexta çirandinê
heye û wexta dirûtina dirûnê heye;
wexta hişbûnê heye û wexta go-
tinê heye; 8 wexta hezkirinê heye
û wexta kerihandinê heye; wexta
cengê heye û wexta li hev hatinê
heye. 9 Ma ji yê ku dike re ji karê
ku tê de kedê dikişîne çi qezenc
heye? 10 Bona ku pê re mijûl bi-
bin, keda ku Xwedê daye mirovan
dîtim. 11 Wî her tiştî, di wexta
xwe de xweşik çê kir; abadînî jî
xist dilên wan, lê belê wusa ku,
mirov nikare ji destpêkê heta da-
wiyê karê ku Xwedê çêkiriye bi-
bîne û derxîne. 12 Ez dizanim ku,
bona wan ji kêfxweşîbûnê û heta
ku rojên wan hene başî kirinê hîn
jî qenctir tiştekî nîne. 13 Him jî
xwarin û vexwarina her zilamî û
ji hemûya keda xwe qencî dîtin,
dayîna Xwedê ye. 14 Ez diza-
nim, her tiştên ku Xwedê kirine,
dê abadîn bin; tiştek lê nayê zêde
kirin û tiştek jê nayê kêm kirin û
bona ku li ber wî bitirsin, Xwedê
wê afirand[1]. 15 Yê ku heye, ji berê
ye û yê ku dê bibe, ji berê ve bûyi-
ye û Xwedê dîsa li yê ku derbas
bûye digerî.

[1] Avakir, an jî: Çêkir.

16 Û dîsa di bin rojê de dîtim
ku, li her derê mafê xerabî heye;
di cîhê dadiyê de jî xerabî heye.
17 Di dilê xwe de gotim: Dê Xwe-
dê serweriyê ji salih re jî, ji xerab
re jî bike; ji ber ku li wir bona her
tiştî û her karî wextek heye. 18 Di
dilê xwe de gotim: Ev kar ji ber
mirovan e, bona ku, ka bila Xwe-
dê wan biceribîne û ew bi xwe
bibînin ku tenê heywan in hatiye
kirin. 19 Ji ber, ya ku tê serê mi-
rovan, tê serê heywanan jî û tiştê
ku tête serê wan yek e; ev çawa
bimire, yê din jî wusa dimire;
hilma hemûyan heye û seratetiya
zilam, ji heywan re nîne; ji ber ku
giştî vala ye! 20 Gişt diçin cîhekî;
gişt ji axê ne û dîsa dizivirin[1] axê.
21 Ma kî dizane ku ruhê lawê
mirov derdikeve jorîn û ruhê hey-
wanê dadikeve xwarê? 22 Û dîtim
ku tu tişt jê qenctir nîne ku zilam
di karê xwe de kêfxweş be; ji ber
ku para wî ev e; ji ber, bona tiştê
ku li pêy wî bibe bibîne, dê kî wî
şunda bîne?

*Tahdeyên li Dinê*

4 Û ez zivirîm û hemû lêdanên[2]
ku di bin rojê de dibin dîtim û a
vay, hêstirên çavên zehmetkêşan!
Û yê ku xemrevîniyê li wan bike
nîne û ji aliyê yên ku zulmê li wan
dikin zordestî! Û yê ku xemrevî-
niyê li wan bike nîne. 2 Û min ji
bilî jîndarên ku hîn dijîn, pesna
miriyan dan 3 û yê ku hîn nebûye
û karê ku di bin rojê de tête kirin
nedîtiye, ji vana herduyan jî zêde-
tir dilgeş hesibandin.
4 Û her ked û her karê qenc diçe
dîtim ku, çavnebariya ku mirovek
ji aliyê cîranê xwe ve dibîne ji ber
vê yekê ye. Ev jî valayî û bona
girtina bayê şuxul e! 5 Yê bêaqil
destên xwe dide ser hev û goştê
xwe dixwe. 6 Bi aramiyê tijîbû-
na lepekî, ji du lepên tijî ên ku bi
kedê û ji xebata ku ji bo girtina
bayê qenctir e.
7 Û ez zivirîm û di bin rojê de va-
lahiyê dîtim. 8 Zilamek heye, jê
re duwem nîne; lawê wî jî, birayê
wî jî nîne û dawiya hemûya keda
wî nîne û çavên wî bi dewlemen-
diyê ve têr nabe. Wê gavê, ma
ez bona kî kedê bikişînim û canê
xwe ji qenciyê mehrûm bikim?
dibêje. Ev jî zehmetek vala û xe-
rab e. 9 Du kes ji kesekî qenctir
e, ji ber ku bona keda wan heq-
destên wan qenc dibe. 10 Ji ber
ku, ger bikevin, dê yek hevalê
xwe rake; lê belê wey li serê yê
ku tenê be û bikeve! Tu kesê ku
wî rake nîne. 11 Him jî du kes
pev re rakevin, dê germ bibin; lê
belê zilamekî tenê dê çawa germ
bibe? 12 Zilamek bi ser yê ku

1 Vedigerin.
2 Zordestî.

tena serê xwe yî bikeve, dê du
kes li hember wî di ber xwe de
bidin; sê qat ben jî zû naqete.
13 Xortê xizan û bi zanyarî, ji qi-
ralê bê aqil û kalepîrê ku êdî niza-
ne şîreta bigire qenctir e. 14 Ji ber
ku ji girtîgehê, bona ku bibe qiral
derket û li welatê xwe bi xizanî
hatibû dinê. 15 Min hemûyên di-
jîn ên ku di bin rojê de sekinîne
tevî xortê duwemê ku li cîhê wî
sekiniye dîtin. 16 Dawiya hemû
netewê, dawiya hemû zilamên
ku li serê wan in, tune bû; lê belê
yên ku li pêy wî hatine, dê pê re
kêfxweş nebin. Bi rastî, ev jî va-
layî û bona girtina bayê xebat e!

*Ji Xwedê bitirse*

5 Dema tu biçî mala Xwedê,
çavnêriyê li lingê xwe bike; ji
ber ku bona rawestandinê nêzîk-
bûyîn, ji dayîna qurbana bêaqilan
qenctir e; ji ber, nizanin ku xe-
rabiyê dikin. 2 Bi devê xwe lez
meke û bila dilê te bona ku li ber
Xwedê gotin gotinê lez nebe; ji
ber ku Xwedê li ezmana ye û tu
li ser erdê yî; bo vê yekê, bila go-
tinên te kêm bin. 3 Ji ber ku bi
zêdeyiya kar xewn tê û bi zêdeyi-
ya gotinê jî dengê bêaqil. 4 Dema
tu qewlê ji Xwedê re bidî, bona
dayîna wê dereng nemîne; ji ber
ku ji bêaqilan hez nake; ya ku te
qewil kiriye bide. 5 Qewil neki-
rina te, ji qewil kirin û nedana te
qenctir e. 6 Devê xwe bernede
ku bila bi bedena te re sûcê nede
kirin û li ber milyaket: Ew xelet
çêbû nebêje; ma çima bila Xwe-
dê bi gotina te hêrs bibe û karê
destên te xera bike? 7 Ji ber ku
di zêdeyiya xewnan de û di zêde-
yiya gotinan de tiştên vala hene;
lê belê tu ji Xwedê bitirse!

*Berhewayiya Dewlemendiyê*
1.Tîm 6,6-10.17

8 Ger tu bibîne ku li vî welatî
xizanan dixin tengasiyê û rasti-
ya dadiyê dikeve zorê, bi vî karî
şaş nebe; ji ber ku li ser yê bilind,
yê hîn jî bilindtir e dinêre û li ser
wan jî yên hîn jî bilindtir in hene.
9 Lê qiralekî ku bixwaze zevî
bêne ajotin, bona welêt ji her alî
ve bifêde ye.
10 Yê ku ji zîv hez dike têrî zîv û
yê ku ji zêdeyiyê hez dike têrî zad
nabe; ev jî vala ye! 11 Gava mal
zêde bibe, yê ku wê dixwe jî zêde
dibin û xeynî bi çavên xwe dîtina
wê, bona xwediyê xwe çi qencî
heye? 12 Dixwazî bila hindikekî
bixwe an jî pirr bixwe, xewa zi-
lamê xebatkar şêrîn e; lê belê têr-
bûna dewlemend, wî nahêle ku
here û rakeve.
13 Di bin rojê de asîwek xerab
heye ku, wê dîtim: Hebûna ku ji
aliyê xwediyê wê ve, bi xesara
xwe veşartin 14 û ev hebûn, bi
şunda zivirandina kar ve tune dibe

û ger bibe bavê lawekî, di destê
wî de tiştek nîne. 15 Ew[1] ji rehma
dayika xwe her çawa derketibe,
dê dîsa, mîna ku hatiye tazî here û
bona ku di destê xwe de bibe, dê
bona keda xwe tiştekî ranehêle.
16 Û di her rewşê de ger çawa
hatibe, dê wusa here, ev jî asîwek
xerab e û ji keda wî ya bona bayê
kişandiye, qezenca wî çi bû? 17
Û him jî di hemû rojên xwe de di
tariyê de dixwe û zehf aciz dibe û
nexweşî û hêrsa wî heye.
18 A vay, tiştê ku qenc û xweşik
dîtim ev e; bila mirov bixwe û ve-
xwe û di hemû rojên temena ku
Xwedê daye wî de, ji hemû keda
ku di bin rojê de kişandiye qenci-
yê bibîne; ji ber ku para wî ev e.
19 Û him jî her zilamê ku Xwedê
mal û dewlemendiyê û bona ku
jê bixwe û para xwe bistîne û bi
keda xwe ve kêfxweş bibe, quwet
dayê ev dayîna Xwedê ye. 20 Ji
ber ku dê bi zêdeyî rojên temena
xwe di bîra xwe de neyne; ji ber
ku dê Xwedê di kêfxweşiya dilê
wî de bersivê bidê.

*Jiyan zû derbas dibe û vala ye*

Wai 2,21-26; 5,9-11; Zeb 39,7

6 Tiştekî xerab, ya ku di bin rojê
de dîtime heye û li ser mirovan
giran e: 2 Zilamek heye ku, Xwe-
dê dewlemendî, mal û mezintiyê
didê û ji her tiştê ku dixwaze,
bona canê wî tiştekî kêm nîne,
lê belê bona ku jê bixwe Xwedê
hêzê nadê, lê belê tenê yekî biyan
wê dixwe; ev vala ye û derdek xe-
rab e! 3 Zilamek bavê sed zarokî
jî be û pirr salan bijî û rojên salên
wî zêde bin, lê belê, ger canê wî bi
qenciyê ve têr nebûbe û li gorekê
nehatibe binax kirin, ez dibêjim
ku, zarokê berî bûyîna xwe ji ber
ve hatiye avêtin ji wî qenctir e;
4 ji ber ku bi valahiyê ve tê û di
tariyê de diçe û navê wî di tariyê
de tête nuxumandin; 5 him jî rojê
nedîtiye û hînî wê nebûye; reheti-
ya viya ji yê din zêdetir e 6 û ger
du caran hezar sal bijî û qenciyê
nebîne, ma hemû naçin derekî?
7 Hemû keda mirov bona devê wî
ye û dîsa jî canê wî têr nabe! 8 Ji
ber ku, ma çi seretatiya zilamê bi
zanyarî ji yê bêaqil heye? Ji xi-
zanê ku dizane li ber yên ku dijîn
bimeşe çi heye? 9 Dîtina çavan, ji
kişandina xwesteka can qenctir e;
ev jî vala ye û şuxula bona girtina
bayê ye.
10 Her çi bûbe, ji zû ve navê wê
hatiye lêkirin û çibûna mirov tête
zanîn û ji yê ku ji xwe xwurttirî re
nakeve keftûleftê. 11 Madem pirr
tiştên ku valahiyê zêde dikin hene,
ma ji wê çi fêde ji mirov re heye?
12 Ji ber, ma kî dizane ku di hemû
rojên temena xwe yî vala û mîna
sîhê derbas kiriye de, bona mirov

[1] Mirov.

tiştê qenc çî ye? Ji ber, ma kî di-
kare ji zilamekî re bibêje ku dê li
pêy wî, di bin rojê de çi bibe?

*Zaniyarî*

7 Navê qenc ji rûnê bêhnxweş
û roja mirinê, ji roja bûyîna
zilamekî xweştir e. 2 Çûna mala
şînê, ji çûna mala ziyafetê qenctir
e; ji ber ku dawiya her zilamî ew
e û yê ku dijî, wê dixe dilê xwe.
3 Keser ji kenê çêtir e; ji ber ku
bi xemgîniya wec, dil hîn jî baş
dibe. 4 Dilê zilamê bi zanyarî li
mala şînê ye; lê belê dilê bêaqilan
li mala kêfxweşiyê ye.
5 Bona zilamekî bihîstina pekan-
dina zilamê bi zanyarî, ji bihîstina
sitrana bêaqilan qenctir e. 6 Ji ber
ku di bin beroşan de qirçîna deviyan
çawa be, kenê bêaqilan jî wusa
ye; ev jî vala ye! 7 Ji ber ku xesp
zilamê bi zanyarî dîn dike û bertîl
fêhmkariyê tune dike. 8 Dawiya
tiştekî ji destpêka wê qenctir e û yê
ku di ruh de bi sebir e, ji yê ku di
ruh de qurre yî qenctir e. 9 Bila di
xeydê de ruhê te ne bi lez be, ji ber
ku xeyd di sînga bêaqilan de bicîh
bûye. 10 Ma çima di rojên berê de
ji vana hîn jî qenctir bûn? nebêje;
ji ber ku pirsiyara te ya di derheqê
vêya de ne bi zanyarî ye!
11 Zanyarî qasî mêrasê qenc e
û bona yên ku rojê dibînin hîn
jî qenctir e. 12 Ji ber ku zanyarî
meterîs e, zîv jî meterîs e; lê belê
seretatiya zanînê ev e ku, zanyarî
xwediyê xwe dijîne. 13 Li karê
Xwedê binêre; ji ber, ma kî dikare
tiştê ku wî xwar kiriye rast bike?
14 Di roja qenciyê de bi kêfxweşî
be; him jî Xwedê yekî li cem yê
din çêkir, da ku, mirov bila tiştê
ku li pêy xwe bibe nebîne.
15 Min di rojên xwe yên vala de
hemûyên vana dîtin; zilamek sa-
lih heye ku di bawerî û qenciya
xwe de tune dibe û zilamek xerab
heye ku di xerabiya xwe de teme-
na xwe dirêj dike. 16 Zêde salih
nebe û xwe zehf bi zanyarî meke;
ma çima tuyê xwe helaq bikî?
17 Bi zêdeyî xerab nebe û bêaqil
nebe; ma çima tuyê berî wexta
xwe bimirî? 18 Pêgirtina vêya
qenc e; destê xwe jê nekişîne; ji
ber, zilamê ku ji Xwedê ditirse, ji
vana hemûyan derdikeve.
19 Zanyarî, zilamê bi zanyarî, ji
deh serwerên li bajêr in zêdetir
xwurt dike. 20 Ji ber ku li rûyê
erdê zilamê salih tuneye ku, her-
tim qenciyê bike û qet guneh
neke. 21 Him jî bona ku tu xeber-
dana qûlê xwe ê ku li te kufrê dike
nebihîzî, dilê xwe nede hemû go-
tinên ku tên gotin; 22 ji ber, dilê te
jî dizanî ku te jî pirr caran, kufrê ji
kesên din re kirin.
23 Min vana hemûyan bi zani-
yariyê ve ceribandin: Ez ê bi zan-
yarî bim gotim; lê belê ew ji min
dûr bû. 24 Tiştê ku heye dûr û pirr

kûr e; ma kî dikare wê bibîne? 25
Zivirîm û dilê min dest bi zani-
yariyê û lêkolîn û lêgerîna zanînê
û sedema tiştan û hînbûna a vay,
xerabî bêaqilî ye û bêaqilî dînitî
ye, kir. 26 Û pîrekê ji mirinê ve
tahltir dîtim, ew pîrek ku dilê wê
dafik û tor û destên wê jî zincîr in;
zilamê ku li ber Xwedê qenc e, ji
wê direve û xelas dibe; lê belê yê
ku sûc dike, dibe dîlê[1] wê. 27 A
vay, waiz dibêje: Bona ku yek û
yek hisabê derxînim vêya dîtim;
28 canê min hîn jî lê digere, lê
belê nedîtim; ji hezaran yek zilam
dîtim; lê belê di wan hemûyan de
pîrekek nedîtim. 29 A vay, tenê
vêya dîtim ku, Xwedê mirov rast
afirand; lê belê ew li gellek dek û
dolavan geriyan.

8 Ma kî mîna zilamê bi zanyarî
heye? Û ma kî bi mahna tiştekî
dizane? Zaniyariya zilam wecê wî
ronî dike û tundiya wecê wî tête
guhertin.

*Qiral guhdarî bike*

2 Ez şîretê didim te: Bi emrê qi-
ral ve bigire, vêya jî ji ber sonda
Xwedê! 3 Ji ber wî derketinê de
lez meke; di karê xerab de nese-
kine, ji ber ku qiral her xwesteka
xwe tîne cîh. 4 Ji ber ku di gotina
qiral de quwet heye û ma kî dikarî
jê re: Tu çi dikî? bibêje? 5 Yê ku
li gor emir bike, rastî tiştê xerab
nabe û dilê zilamê bi zanyarî wext
û daraziyê ji hev cihê dike; 6 ji
ber ku bona her tiştî wext û darazî
heye; ji ber ku derdê mirov li ser
wî giran e; 7 ji ber ku bi tiştê ku
dê bibe nizane; ji ber ku, ma dê kî
jê re bighîne ku ka dê çawa bibe?
8 Bona girtina ruh, yê ku quweta
wî di ser ruh de ye nîne û yê ku
di ser roja mirinê de xurttir e nîne
û di cengê de azad berdan nîne û
xerabî xwediyê xwe xelas nake.
9 Min hemûya vêya dît û dilê xwe
xistim hemû karên ku di bin rojê
de dibin; dem dibe ku serweriya zi-
lamekî, li ser yekî din, bi xesara wî
ye. 10 Bi vî awayî binaxkirina xe-
raban dîtim û hatin goristanê, yên
ku rastiyê kirine jî, ji cîhê pîroz ve
çûn û di bajêr de hatin ji bîr kirin;
ev jî vala ye! 11 Madem ku li hem-
ber karê xerab, darazî bi zûyî nayê
kirin[2], dilê mirovan ji ber vêya,
bona ku xerabiyê bikin, di hundirên
xwe de metirsiyê dibînin. 12 Yê ku
sûcê dike sed carî xerabiyê bike û
rojên xwe dirêj bike jî, ez dîsa di-
zanim ku dê ji yên ku ji Xwedê ve
ditirsin, ji yên ku li ber wî ditirsin
dê bibe qencî; 13 lê belê dê ji yê
xerab re nebe qencî û dê rojên wan
ên mîna sîhê ne, dirêj neke; ji ber
ku li ber Xwedê natirse.

---

1 Êsîr, mehkûm, an jî: Girtî

2 Nayê cîh.

14 Tiştekî vala, yê ku li wecê erdê
ve tête kirin heye: Zilamên salih
hene ku, yên tên serê wan, li gor
karên zilamên xerab in; zilamên
xerab hene ku tiştên têne serê
wan, li gor karên zilamên salih in;
ev jî vala ye, gotim.15 Û pesna-
hiya kêfxweşiyê dam, ji ber ku di
bin rojê de bona mirov ji xwarin û
vexwarin û bi kêfxweşî bûnê hîn
jî qenctir tiştek nîne; ji ber ku di
keda ku hemû rojên temena wî ya
ku Xwedê di bin rojê de dayiye
de, tiştê ku jê re bimîne ev e.
16 Dema bona hînbûna zaniyariyê
û dîtina karên ku li rûyê erdê tên
kirin dilê xwe danîm; ji ber, zilamê
ku bi şev û roj xew nakeve çavên
wî jî heye; 17 her karên Xwedê
dîtim ku, mirov nikare karê di bin
rojê de tête kirin bibîne û derxîne;
ji ber ku bona lêgerîna wê, mirov
çiqas kedê bikişîne, dîsa jî nikare
wê bibîne û derxîne û zilamê bi
zanyarî jî bona fêhmkariyê bifikire,
dîsa nikare wê bibîne û derxîne.

*Mirov di destê Xwedê de ne*

9 Ji ber ku bona lêkolîna vêya
hemûyan, giştikî xistim dilê
xwe; salih û zilamên bi zanyarî û
karên wan di destê Xwedê de ne:
hezkirinî an jî kerihandinî, mirov
bi wê nizane; her tişt li hember
wan e.
2 Her tişt bi yek awayî tê serê
her kesî; tiştê ku tê serê salih û
xerab, qenc û paqij û mindar; yê
qurbanê pêşkêş dike an jî nake
yek e; zilamê qenc her çawa be,
yê ku sûc dike jî wusa ye; yê ku
sondê dide jî, mîna yê ji sondê di-
tirse ye. 3 Di her tiştê ku di bin
rojê de, tête çêkirin de asîw ev e
ku, tiştê tête serê her kesî yek e û
him jî dilên mirovan bi xerabiyê
ve tijî ne û di domahîka temena
wan de di dilê wan de dînitî heye
û jê pê ve beşdarî miriyan dibin. 4
Ji ber ku ji bona hemûyên ku tevî
jîndaran in re hêvî heye; ji ber ku
kûçikê zindî, ji şêrê mirî qenctir
e. 5 Ji ber, yên ku dijîn dizanin ku
dê bimirin; lê belê mirî bi tiştekî
nizanin û êdî bona wan mîşe
nîne; ji ber ku bîranîna wan hati-
ye ji bîr kirin. 6 Hezkirina wan jî,
neyariya wan jî, çavnebariya wan
jî ji zû ve tune bûye û di tiştekî ku
di bin rojê de hatiye kirin de êdî
abadîn bona wan par nîne.
7 Here, bi kêfxweşiyê nanê xwe
bixwe û bi dilê qenc xemra xwe
vexwe; ji ber ku Xwedê ji zû ve bi
karên te razî bûyiye. 8 Bila kincê
te her tim sipî be û rûnê bêhnxweş
ji ser serê te ve kêm nebe! 9 Di
hemû rojên vala yên temena ku di
bin rojê de daye te de, bi pîreka
xwe ya ku tu jê hez dikî, jiyan-
ek xweş biborîne; ji ber ku ji ji-
yanê û ji keda ku te di bin rojê de
kişandiye para te ev e. 10 Tiştê ku
bona li ser xebat kirinê te dîtiye

her çi be, bi hêza xwe li ser wê
bixebite; ji ber ku li warê miriyan,
ya ku tuyê biçê kar û raman, zanîn
û zanyarî nîne.
11 Zivirîm û di bin rojê de dîtim
ku, pêşbazî ne bona mirovên ku
lingên wan lez in û ceng ne bona
egîdan e, nan jî ne bona zanyaran
e, dewlemendî jî ne bona zilamên
fêhmkar, dirûdî jî ne bona zi-
lamên bi zanîn in; ji ber ku wext û
rewş pêrgîniya vana hemûyan di-
kin. 12 Ji ber ku mirov jî bi wexta
xwe nizane; masî çawa bi tora xe-
rab re bête girtin û civîk çawa bi
dafikê ve bête girtin, mîna vana
mirovan jî dema nişka ve wexta
xerab bi ser wan ve bikeve, wusa
bi wê tên girtin.

*Zaniyarî ji bêaqiliyê qenctir e*

13 Di bin rojê de, bi zanyarê vêya
jî dîtim û ji min re mezin hate
xuyanîbûn: 14 Bajarek biçûk
hebû û tê de hindik zilam hebûn û
li dijî wê, qiralekî mezin hat û dor
lê girt û li hember wê meterîsên
mezin çêkirin. 15 Û di wê de zila-
mek xizan ê bi zanyarî hate dîtin
û bi zaniyariya xwe bajar xelas
kir; lê belê tu kes wî zilamê xi-
zan neanîn bîra xwe. 16 Û gotim:
Zanyarî ji hêzê qenctir e; lê belê
zaniyariya zilamê xizan biçûk tête
dîtin û gotinên wî nayên bihîstin.
17 Gotinên yên bi zanyarî yên ku
di nava bêdengiyê de tên bihîstin,
ji qêrîna yê ku di nava bêaqilan de
bûye serwer qenctir e. 18 Zanyarî
ji haletên cengê qenctir e; lê belê
yekî sûcdar pirr qenciyan tune
dike.

10 Hûrmêşên mirî, rûnê
ettar genî û xera dikin; hinek
bêaqilî jî, di pîvanê de ji zanyarî û
mezintiyê zêdetir giran tê! 2 Dilê
zilamê bi zanyarî li aliyê wî yî rastê
ye; lê belê dilê yê bêaqil, li aliyê wî
yî çepê ye. 3 Him jî dema zilamê
bêaqil di rê de digere fêhmkariya
wî kêm e û bêaqiliya xwe ji her
kesî re dibêje. 4 Ger hêrsa serwer
li dijî te zêde bibe cîhê ku tu lê yî
bernede; ji ber ku nermî, sûcên me-
zin didewisîne.
5 Xerabiyek ku di bin rojê de dîti-
me heye, mîna çewtiya ku ji destê
serwer ve derketiye yî: 6 Bêaqili-
yê datînin miqamên herî bilind û
yên dewlemend li jêr ve rûdinin.
7 Dîlan li ser hespan, serokan
jî li erdê, mîna dîlan di meşê de
dîtim.
8 Yê ku kortalê dikole, dikeve
hundirê wê û mar bi yê ku koncalê
di dîwêr de vedike vedide. 9 Yê
ku kevir jêdike ji wan diêşe; yê ku
êzingan diqelişîne, ji ber vê yekê
dikeve xeterê. 10 Ger hesin ko be
û devê wê neyê tûj kirin, divê hîn
jî zêdetir quwetê lê serf bikin; lê
belê bona serfiraziya karekî zan-
yar qenc e. 11 Ger mar berî sêr

çêkirinê pê vede, wê gavê fêda
sêrbaz nîne.
12 Gotinên devê zilamê bihîkmet
letîf in; lê belê lêvên bêaqil wî da-
diqurtînin. 13 Destpêka gotinên
devê wî bêaqilî ne û dawiya go-
tina wî dînitî ye. 14 Û zilamê bêa-
qil gotinê zede dike, lê belê tu kes
nizane ku ka dê çi bibe û ma dê kî
tiştê ku li pêy wî bibe jê re bibêje?
15 Keda bêaqilan wan diwestînin;
ji ber, nizane ku ka dê çawa here
bajêr.
16 Ya welat, dema qiralê te zaro-
kek be û serokên te sibehê ziya-
fetê bikin, wey li te! 17 Ya welat,
gava qiralê te zadegan be û se-
rokên te ne di nava serxeweşiyê
de, di nava quwetê de xwarinê
bixwin tu çi dilgeş î! 18 Bi har-
bûnê xanî têk diçe û bi sistiya
destan baran di hundirê xanî de
dilop dike. 19 Ziyafet bona kenê
tête çêkirin û xemr şabûnê dide
jiyanê û zîv têra hemûyan dike.
20 Heta di ramana xwe de jî kufrê
ji qiral re meke û di odeka xwe ya
raketinê de kufrê ji dewlemendan
re meke; ji ber ku civîka ezmanan
dengê dikşîne[1] û yê ku bazikên
wê hene gotinê têdighîne.

*Qenciyê Bike*

11 Nanê xwe bavêje wecê
avan[2]; ji ber ku tuyê li pêy
pirr rojan wê bibîne. 2 Parê bide
heft kesî, heta bighêje heyşt kesî;
ji ber ku tuyê nizanibe ka li rûyê
erdê çi xerabî heye! 3 Ger ewr bi
baranê ve tijî bin; dê li rûyê erdê
ve vala bibin û ger darek ber bi
rojhilatê an jî ber bi rojavayê ve
bikeve ew dar li wê derê, li cîhê
ku dikeve dimîne. 4 Yê çavdêri-
yê li bayê dike, naçîne û yê ku
li ewran binêre, çinandinê nake.
5 Mîna ku tu nizanî rêya bayê
çî ye û hestî çawa di zikê pîreka
ducanî de mezin dibin, tu wusa
karê Xwedayê ku her tiştî dike jî
nizanî. 6 Tova xwe sibehê biçîne
û heta êvarê aramiyê nede destê
xwe; ji ber ku tuyê nizanibî ev an
ew dê qenc bibin, an jî her du pev
re di yek derecê de dê qenc bibin.
7 Ronahî jî şêrîn e û dîtina rojê ji
çavan re xweş e. 8 Belê, ger zi-
lam pirr salan bijî, bila di hemûya
wana de kêfxweş bibe; lê belê
bila rojên tarî di bîra xwe de bîne,
ji ber ku dê ew ê jî zêde bibin. Her
tiştê ku tê, vala ye!

*Rûmeta Ciwaniya xwe bizanibe*

9 Ya zilamê ciwan, di ciwantiya
xwe de şa bibe û di rojên ciwani-
ya xwe de bila dilê te, te kêfxweş
bike, di rêyên dilê xwe de û di
dîtinin çavên xwe de bimeşe; lê
tenê bizanibe ku, dê bona vana

[1] Xeberê, an jî: Agahiyê dibe.
[2] Nanê xwe bavêje li ser rûyên avan.

hemûyan, Xwedê te bibe darazi-
yê. 10 Bo vê yekê keserê ji dilê
xwe ve derxîne û xerabiyê ji be-
dena xwe ve dûr bixîne; ji ber ku
çaxa tezebûn û egîdiyê vala ye!

*Yê ku te Afirandiye di bîra xwe de bîne*

12 Berî ku rojê xerab werin û
berî salên ku tu: Ez ji wan
zewqê nagirim; bibêjî nêzîk bi-
bin, 2 berî ku roj, ronahî, heyv û
stêrk tarî bibin û berî ku paşî ba-
ranê ewr vegerin, di rojên ciwani-
ya xwe de, yê ku te Afirandiye[1] di
bîra xwe de bîne; 3 – di wê roja
ku, dê yên ku li benda malê ne
bilerizin û yên xwurt xwar bibin
û pesnahîkar, ji ber ku kêm dibin,
dê ji ber kar bimînin û yên ku di
şivakan de dinêrin dê tarî bibin
4 û gava dengê aşê hêdî bibe, de-
riyê cot, yê ku li kuçê ve vedibe,
dê bê girtin û zilam dê bi dengê
civîkê rabe û dengê hemû qîzikên
mûsîkê dê kêm bibe; 5 him jî dê
ji dengê bilind ve bitirsin û dê di
rê de toqîn bibin û dê darê bihîfê
çîçegan vekin û dê kulî giran
werin û dê xwestek lawaz bibe;
ji ber ku dê mirov, abadîn herin
mala xwe û yên ku şînê bigirin dê
di kuçê de bigerin; – 6 berî têla
zîv biqete û berî ku tasa zêr bişkê
û berî ku cer di kaniyê de perçe
bibe û berî ku di bîrê de dolaba
avê bişkê 7 û berî ku ax vegere
erdê, rewşa xwe yî berê û berî ku
ruh vegere Xwedayê ku wê daye,
yê ku te Afirandiye di bîra xwe
de bîne. 8 Valayê valayan! Waiz
dibêje: Her tişt vala ye!

*Gotina Dawîn*

9 Û li pêy vêya, Waiz ji ber ku
zanyar bû, hîn zanînê fêrî netewê
dikir û guh da û lêkolînê kir û gel-
lek methelokan nivîsand[2]. 10 Waiz
bona dîtina gotinên xweş û yê ku
bi rastiyê ve hatiye nivîsandin,
bona gotinên rasteqîniyê şuxulî.
11 Gotinên yên bi zanyarî mîna
misasa ne û gotinên hosteyên
civatan mîna bizmarên qenc ha-
tine lêxistin; ji aliyê şivanekî ve
hatine dayîn. 12 Û xeynî vêya ya
lawê min, xwe biparêze! Dawiya
çêkirina pirr pirtûkan nîne û pirr
xwendin rawestina bedenê ye.
13 Dawiya kar ev e: Her tişt ha-
tin bihîstin; ji Xwedê ve bitirse û
bi emirên wî ve bigire[3], ji ber ku
hemû wezîfeya mirov ev e. 14 Ji
ber ku dixwaze bila baş be an jî
xerab be, tevî her tiştên veşartî, dê
Xwedê her tiştî bibe daraziyê.

1 Xwedê, Afirînende.
2 Pirr methelokan rêz kir.
3 Li gor emirên wî bike.

# HELBESTA HELBESTAN

*Pêşgotin*

Helbesta Helbestan, murxa evîniyê ye. Bi pirranî ji helbestên du kesê ku yek mêr û yek jî pîrek e, avêtine ber hev pêk tê. Mîna ku Pirtûk bi "Helbesta Helbestan, ya Silêman e" dest pê dike, bi navê "Murxa Silêman" jî tête zanîn.

Cihû, Helbesta Helbestan mîna têkiliyên di navbera Xwedê û gelê wî de dişibînin, Xrîstiyan jî mîna têkiliya di navbera Mesîh û dêrê de yî dibînin.

1 *Helbesta Helbestan,*
*ya Silêman e.*

*Şûlamît:*

2 Bila min bi ramûsanên devê xwe
ve ramûsîne, ji ber ku pelanên te,
ji xemrê qenctir in.
3 Ji aliyê bêhnê ve tolgîna te çi
xweşik e. Navê te mîna tolgîna ji
qaba xwe dirije ye,
ji ber vêya keçik ji te hez dikin!
4 Min bi xwe ve bikişîne, em ê
li pêy te baz bidin. Qiral min bir
odên xwe yî hundirîn:
Em bi te re fireh û kêfxweş dibin.
Em ê hezkirina te, ji xemrê zêde-
tir di bîr de bînin. Ew bi rastî ji te
hez dikin!
5 Ez reşik im, lê belê xweşik im,
ya keçên Orşelîmê! Mîna ça-
dirên Kedarê, mîna dawê çadira
Silêman. 6 Li reşikbûna min ne-
nihêrin, ji ber ku rojê min qemi-
rand[1]! Lawên diya min, bi min
re xeyidîn. Min kirin notirvanê
rezan, lê belê ez li benda rezê xwe
nemam! 7 Ya delalê canê min,
bigehîne min, ka tu keriyê xwe li
ku diçêrîne, nîvrojê wan li ku dikî
mexelê? Ji ber ku keriyê hevalên
te li cem te ne, çima ez bibim mîna
pîrekek wecê wê nuxumandî?

*Silêman:*

8 Ya tu, pîreka di nava pîrekan de
herî xweşik, ger tu vêya nizani-
be, derkeve pêy şopên keriyê û li
cem çadirên şivanan karikên xwe
biçêrîne!
9 Ya delala min, ez te mîna mehî-
na di erebeyên Fîrawûn de girê-
dayiye dişibînim! 10 Lamên te

[1] Ez li ber rojê ûsa bûm!

bi guliyên poran ve, histuyê te bi
gerdeniyan ve çi xweşik e! 11 Em
ê bi qumçikên zîv, rêzên zêrê ji te
re çêkin!

*Şûlamît:*

12 Dema qiral di sifra xwe de
rûniştîbû, rûnê minî simbilê bêh-
na xwe yî xweş belav kir. 13 Yê
di nava pêsîrên min de radikeve,
buxçika mura safî ye, ji min re
delalê min. 14 Di rezên Engedî de
gurzek çîçeka enzerûtê[1] ye, ji min
re delalê min.

*Silêman:*

15 Ax, çiqas xweşik e evîna min,
ax, tu çi xweşik e! Çavên te (mîna)
kevokan in!

*Şûlamît:*

16 A vay, tu jî xweşik e delalê min,
him jî çiqas şêrîn e! Û şênahiye
warê me, ji hêşînahiya teze ye.
17 Darên erzê ne beştên mala me,
nexşên tawanê me jî selwê ne.

*Şûlamît:*

2 Ez gulekî Şaronê me, sosinek
çema me.

*Silêman:*

2 Di nava keleman de sosin çawa
bin, di nava keçikan de evîna min
ûsa ye.

*Şûlamît:*

3 Di nava darên daristanê de, darê
sêvê çawa be, di nava lawikan
de delalê min ûsa ye. Ez bi zewq
girtinê, di siya wî de rûniştim û
mêwa wî, ji pidûyê min re şêrîn
bû. 4 Min bir mala ziyafetê û ala
wî ya di ser min re, hezkirin e.
5 Bi mewîjan hêzê bidin min, bi
sêvan min bi can bikin; ji ber ku
ez nexweşê evînê me! 6 Bila milê
wî yê çepê di bin serê min de be,
yê rastê jî min himbêz bike!
7 Li ser xezalan an jî li ser askên
beyarê, ez we didim sond xwa-
rinê, ya keçên Orşelîmê! Bona ku
hûn evînê min hişyar mekin û ra-
nekin, heta ku dilê wî xweş bibe!
8 Dengê delalê min! A vay, ji
serê çiyan dipengize, ji serê giran
hol dibe û tê. 9 Delalê min mîna
xezalan an jî çêla aska ye. A vay,
li paşî dîwarê me disekine; ji qe-
fesan çavnêriyê dike. 10 Delalê
min, bersivê da min û ji min re
got: Evîna min, xweşika min,
rabe û were! 11 Ji ber ku, a vay,
zivistan derbas bû, baran jî der-
bas bû û çû. 12 Li erdê ve çîçeg
hatin xuya kirin, dema sitranê hat
û di warê me de, dengê qumriyê
hate bihîstin. 13 Darê hêjîrê di
gîhandina hêjîra xwe yî xag de,
mêw bi çîçeg dibin û bêhna xweş
didin. Delala min, xweşika min,
rabe û were! 14 Kevoka min di
kovikên zinara de, ya di korta-

---

1 Hine, xene.

la zinaran de[1], bejna xwe nîşanî
min bide, ji ber ku dengê te şêrîn
û bejna te jî xweşik e! 15 Ji me
re roviyan bigirin, roviyên biçûk,
yên ku rezan xera dikin. Ji ber ku
rezên me bi çîçeg bûn[2]! 16 Delalê
min yê min e û ez jî yê wî me,
di nava sosinan de pez diçêrîne.
17 Dema roj hênik bibe û sî dirêj
bibin, şunda vegere, delalê min!
Li ser çiyayên qelişî, mîna xeza-
lan, mîna çêla askan bibe!

3 Şevê li ser livînê xwe, ez li
wî, li delalê canê xwe geri-
yam, li wî geriyam, lê belê wî
nedîtim. 2 De, ez rabim û di bajêr
de bigerim, di kuçe û qadan de, li
wî, li delalê canê xwe bigerim. Li
wî geriyam, lê belê wî nedîtim.
3 Notirvanên, di bajêr de dige-
rin min dîtin, pirsa we wî dîtine,
delalê canê min? ji wan pirsîm.
4 Dema ez ji wan derbasî wê de
bûm, hema wî dîtim, delalê canê
xwe, bi wî girtim û bernedam,
heta mala diya xwe, heta wî bi-
rim oda pîreka ku min aniye dinê.
5 Ez li ser xezalên mê an jî li ser
askên qirê yên mê, we didim
sond xwarinê ya keçên Orşelîmê:
Bona ku hûn evînê hişyar nekin
û ranekin, heta ku dilê wî xweş
bibe!
6 Ev kî ye, ji çolê derdikeve? Mîna
sitûnên dûhê, bi mura hatiye tutsî
kirin û bi kunukê re, bi her cûreyê
biharatê firotger re. 7 A vay, tex-
tîrewananê Silêman ji egîdên Îs-
raêlê, şêst egîd li dora wî ne. 8 Gişt,
mêrên bi şûr û cengê ve hatine hîn
kirin, ji toqîna şevan, şûrên her kesî
li pişta wî. 9 Qiral Silêman, ji darên
Lubnanê, ji xwe re textîrewanekê
çekir. 10 Sitûnên wê, ji zîvê ve ava
kir, binê wî ji zêran, cîhê rûniştinê
ji zîweleqê, keçê Orşelîmê, hundirê
wê, bi hezkirinê ve xemilandin.
11 Ya keçên Siyonê! Derkevin, qi-
ral Silêman bi taca wî ve bibînin,
ew taca ku di roja daweta wî de û
di roja kêfxweşiya wî de diya wî li
serê wî kiribû!

*Silêman:*

4 Ax, tu çi xweşik î evîna min,
ax, tu çi xweşik î! Di paşî
pêçeka te de çavên te mîna ke-
vokan, porê te mîna keriyê bi-
zinên ku li qeraxa Çiyayê Gîleadê
banîn e. 2 Diranên te, mîna keri-
yê pezên ku nû hatine birrîn û ji
şuştinê derketine ne. Tim cotên
wan mîhan hene û di nava wan
de, yekî bêberxik nîne. 3 Lêvên
te, mîna qeytanek gewez, devê te
jî çiqas xweşik e, di paşî pêçika
te de lamên te, mîna pariyek hina-

1 ...ya di qeraxa mişefil (kortal) an de, an jî: Ya di veşartina dîvarê zinaran de.

2 Çîçek da.

rê ne. 4 Histuyê te mîna qûleya
Dawid, ew qûleya ku bi xani-
yê çekan ve hatiye ava kirin. Li
ser wê hezar mertalê mezin, tim
mertalê egîdan hatiye daliqandin.
5 Pêsîrên te, cotek çêlên xezalan,
mîna du çêlikên askan, yên di
nava sosinan de diçêrin. 6 Dema
roj hênik bibe û sî dirêj bibin, ez ê
herim çiyayê Murê û girê Bixurê.
7 Tu tim xweşik e, evîna min û di
te de qet qisûr nîne. 8 Bi min re, ji
Lubnanê, ya dergistiya min! Bi
min re, ji Lubnanê were! Ji girê
Amana, ji girên Senîr û Hermonê,
ji qulên şêran, ji çiyayê pilingan
binêre! 9 Bi nêrînek çavên xwe, te
rahişt dilê min, xwuşka min, der-
gistiya min! Bi zincîrekî gerdana
xwe, te dada dilê min! 10 Pelan-
dinên te çiqas xweş in, xwuşka
min, dergistiya min! Pelandinên
te, ji xemrê ve çiqas xweştir in.
Bêhna tolgîna te jî ji her cûre bi-
haratê! 11 Ya dergistiya min, lêvên
te hungivê duniqutînin, hungiv û
şîr, di bin zimanê te de ne; bêhna
kincên te jî wekî bêhna Lubnanê
ye. 12 Xwuşka min, dergistiya
min, bexçayekî girtî ye, çavkani-
yek girtî ye, kaniyek hatiye mor
kirin e. 13 Şivên te buhuştek hi-
naran e, bi mêwên xweşik; bi
şivên hune û nardînê ve. 14 Bi
nardîn û zefranê, bi qamîşên bi-
bêhn û darçînê ve û bi her cûreyê
darên kunukê ve, bi darên mur û
zendeqê, bi her cûreyên serbiha-
ratê re. 15 Tu çavkaniya bexçe ye,
bîra avên zindî û şêlavên ji Lub-
nanê ve diherikin.

*Şûlamît:*

16 Hişyar be ya bayê bakur! Û tu
jî were, ya bayê başûr! Di bexçê
min de, ba bide ku, bila belesanên
wê binuqute, bila delalê min were
bexçeyê xwe û mêwên wê yî bi-
jartî bixwe!

*Silêman:*

5 Ez ketim bexçê xwe, xwuşka
min, dergîstiya min! Mura
xwe, tevî belesana xwe dam hev.
Çîça xwe, bi hungivê xwe re
xwarim, xemra xwe, bi şîrê xwe
ve vexwarim. Ya hevalno, bi-
xwin, vexwin, ya delalno û mest
bibin!

*Şûlamît:*

2 Ez radiketim, lê dilê min hişyar
bû! Dengê delalê min e! yê li derî
dixe: Ji min re veke, xwuşka min,
evîna min, kevoka min ya bêem-
sal! Ji ber ku serê min bi xunavê
ve tijî bûyî, biskên min bi dilopên
şevê ve. 3 Gotim, fîstanê xwe ji
xwe kirime, ka ez çawa li xwe
bikim? Lingên xwe şuştime; çawa
wan gemarî bikim? 4 Delalê min,
ji qulikê ve destê xwe dirêj kir û
hundirê min bona wî lerizî. 5 Ez
rabûm, bona ku ji delalê xwe re

derî vekim û mura li ser destikê
zendê mayî, ji destên min nuqutî,
rûnê murê ji tiliyên min. 6 Min
derî ji delalê xwe re vekir, lê delalê
min vekişiya bû û çû bû. Dema wî
gotinan ji min re digot, ez ji xwe
ve derbas bûme; ez li wî geriyam,
lê belê nedîtim; bangî wî kirim,
lê belê bersivê neda min. 7 Notir-
vanên di bajêr de digeriyan min
dîtin, li min xistin, min birîndar
kirin; notirvanên dîwarên bajêr,
pêçika min ji ser min ve rakirin.
8 Ez we didim sondxwarinê, ya
keçên Orşelîmê! Ger hûn delalê
min bibînin, ji wî re bibêjin ku ez
nexweşê evînê me!

*Keçên Orşelîmê:*

9 Ma delalê te, xeynî delalekî çi
ye? Ya tu, pîreka di nava pîrekan
de herî xweşik! Ma delalê te, xey-
nî delalekî çi ye, ku tu ûsa bi me
re sondê dide xwarinê?

*Şûlamît:*

10 Delalê min sor û sipî ye, yê
di nava deh hezaran de birêz ew
e! 11 Serê wî safî zêr, biskên wî
dagerîn, mîna qelareşkê reş e.
12 Çavên wî mîna kevokên li
qeraxa avên diherikin e; bi şîr
ve hatiye şuştin, mîna cewahîrê
di hêlîna xwe de rûdine ye.
13 Lamên wî dibêjî qey mişarên
çîçega, diraxeyên bêhnxweşan;
lêvên wî sosin in; rûnê murê
duniqutîne. 14 Li ser destên wî
lûleyên zêrînî, yên ku zimrûda
ezmanî lê hatine kutan, gewda wî
karê diranê fîlan, kevirên yaqûtî
şîn lê hatiye kutan. 15 Pêlên wî
sitûnên mermerî ne, li ser binlin-
giyan ve hatiye ava kirin; ji zêrê
safî; xuyaniya wî mîna Lubnanê,
mîna darên erzê ne. 16 Devê wî
pirr şêrîn û her tiştê wî xweşik in.
Delalê min ev e, belê, yara min ev
e, ya keçên Orşelîmê!

*Keçên Orşelîmê:*

6 Delalê te çû ku derê? Ya tu,
pîreka di nava pîrekan de herî
xweşik! Delalê te, beriyê xwe da
ku derê? Û em dixwazin bi te re
li wî bigerin. 2 Bona ku li bexçan
keriyê xwe biçêrîne û sosinan
biçîne, delalê min daket bexçeyê
xwe, daket mişêra çîçegên
bêhnxweş. 3 Delalê min yê min
e û ez jî ya wî me; yê ku di nava
sosinan de keriyê xwe diçêrîne.

*Silêman:*

4 Tu delala min, tu mîna Tîrtsa
xweşik e. Tu mîna Orşelîmê di-
lovan e, mîna artêşa alê vekiriye,
tirsehêz e. 5 Çavên xwe ji min
bizivirîne, wan min mexlûb ki-
rin, porên te, mîna keriya bizinên
li dawên çiyayê Gîleadê baniyane
nin. 6 Diranên te, mîna keriya pe-
zên ji şuştinê derketiye ne. Tim
cotên wan mîhan hene û di nava

wan de yekî bê berxik nîne. 7 Di
paş pêçeka te de lamên te, mîna pa-
riyek hinarê ne.
8 Li wir şêst qiralîçe û heyştê ca-
riye hene û keçikên nezewicîne jî
bê hejmar. 9 Yekane ye, kevoka
min ya bêhempa; zaroka dayika
xwe ya yekane ye; bijartêya dayi-
ka ku wê aniye dinê ye. Keçik
wê dîtin û ji wê re gotin: Çiqas
kêfxweş e! Qiralîçe û cariye wê
dîtin û pesnê wê dan:
10 Nêrînên wê mîna berbangê,
mîna heyvê xweşik, mîna rojê
paqij, mîna artêşa alê vekiriye tir-
sehêz e, ev pîreka kî ye?

*Şûlamît:*

11 Bona ku şivên hêşîn yên newalê
bibînim, gelo mêwan kulîlkên
xwe dan. Gelo hinar çîçeg veki-
rine, ez bibînim, daketim bexçeyê
gûzan. 12 Canê min, bêyî zanîna
min, min xist nava erebeyên qew-
ma min ya bişeref[1].

*Keçên Orşelîmê:*

13 Vegere, vegere ya keça
Şûlamîtê; bizivire, bizivire ku em
li te binêrin!

*Şûlamît:*

Çima hûn dixwazin ku li keça
Şûlamîtê, mîna li lîstika Maha-
nayîmê binêrin?

*Keçên Orşelîmê:*

7 Lingên te di nava solan de çi
xweşik in, ya qîza mîr! Girde-
yên[2] te yên tixis mîna cewahîran,
karê destên hoste. 2 Navzika te,
tasekî gilover, di wê de xemra tev-
lihev kêm nîne; zikê te koma geni-
man, bi sosinan ve xemiliye. 3 Her
du pêsîrên te, wekî cotek xezalan,
cotika çêlên askan. 4 Mîna qûleya
ji diranê fîlê ye histuyê te; hewzên
Heşbonê ne, ên ku li cem deriyê
Bat-Rabbîmê ne, çavên te. Mîna
qûleya Lubnanê ye pozê te, ya ku
berbi Şamê ve dinihêre. 5 Serê te,
mîna Karmelê li ser te û porê serê
te jî wekî erxewanê; qiral bûye
hêsîrê biskên te.

*Silêman:*

6 Di nava zewqan de, ya evî-
na min, tu çi xweşik û çi şêrîn
î! 7 Ev bejna te mîna darê xur-
mê û pêsîrên te jî mîna goşiyan
e. 8 Gotim ku, ez derkevim ser
darê xurmê, bi guliyên wê bigi-
rim; bila pêsîrên te bibin mîna
goşiyên tiriyê û bêhna hilma te jî
mîna sêva 9 û devê te, mîna xem-
ra herî qenc,

*Şûlamît:*

...ew xemra ku, ji lêvên yên raketî
ve windayî, bona delalê min ras-
terast diherike.

---

1 Birûmet, maqûl.

2 Qorik, tilor...

10 Ez yê delalê xwe me û yê ku
wî bêrî kiriye jî ez im. 11 Were
delalê min, em derkevin qirê;
di gundan de şevbuhurtka xwe
bikin. 12 Serê sibehan zû, em
herin rezan; binêrin, gelo mêw
kulîlkên xwe dane, çîçega wî
vebûye û hinar bi çîçeg bûne? Ez
ê li wir, hezkirina xwe bidim te.
13 Gîhayên lufahê bêhnê xweş
didin û li ber deriyên me, ji her
celebê mêwên hişk û teze yên
xweşik hene, min wana, ya delalê
min, bona te veşartin!

*Hezkirin Pirr bihêz e*

8 Xwezîka tu ji min re biba
mîna birayên ku pêsîra
dayika min mêtine! Dema te li
derve bidîtima, te radimûsan-
dim û min jî şermezar nedikirin.
2 Ez diketim pêşiya te û te dianîm
mala dayika xwe; te yê hînî min
bikira; min ji xemra xwe yî
bi biharat û ji ava hinara xwe, ji
te re bida vexwarinê. 3 Dê destê
wî yê çepê di bin serê min de
be, yê rastê jî min himbêz bike!
4 Ez we didim sond xwarinê,
ya keçên Orşelîmê! Bona ku
hûn evînê hişyar mekin û rane-
kin, heta ku dilê wê xweş bibe!
5 Ev pîreka ku xwe sipartiye
evînê xwe û ji çolê ve derdikeve
kî ye?

*Silêman:*

Min di binya dara sêvê de te hişyar
kir; dayika te li wir bo te janê
kişand, pîreka ku te aniye dinê,
li wir janê kişand. 6 Min, mîna
morekê deyne ser dilê xwe; mîna
morekê deyne ser milê xwe! Ji ber
ku hezkirin, mîna mirinê bihêz e;
xîret, mîna warê miriyan hişk e;
pêtên wê, mîna pêtên agir, pêta
ku pê dikeve û dişewitîne. 7 Avên
mezin nikarin hezkirinê bitefînin
û çem nikarin bi ser wê bikevin.
Ger mirovek, di berdêla hezkirinê
de giştika hebûnên mala xwe bide,
dîsa jî dê bi tenê biçûk bê dîtin!

*Keçên Orşelîmê:*

8 Xwuşkekî me yî biçûk heye û
hîn pêsîrên wê tune ne; dê roja
ku wê bixwazin7; gelo em ê bona
xwuşka xwe çi bikin? 9 Ger ew
dîwarek be, em ê li ser wê qûleyek
ji zîvê çê bikin û ger deriyek be,
em ê wê bi darên erzê ava bikin!

*Şûlamît:*

10 Ez dîwar im û pêsîrên min jî
mîna qûleyan, pîreka xweşî dîtinê
çawa be, wê demê ez jî di çavên
wî de ûsa bûm.
11 Li Baal-Hamonê rezê Silêman
hebû, ji kirêkiran re rezê xwe da
kirê, bona dexlê wê, her yek hezar
zîvî dianîn. 12 Rezê ku malê min

1 Dê roja ku bona wê gotin bên gotin, an jî: Bona zewacê bê sozdarkirin.

e, li ber min e; bila hezar zîv ji te re be, ya Silêman, du sed zîv jî, bila ji yên ku bi dexlê digirin re be!

*Silêman:*

13 Ya tu, pîreka ku li bexçan rûniştiye, heval dengê te guhdarî dikin; ji min re jî bide bihîstin!

*Şûlamît:*

14 Baz bide, ya delalê min û li ser çiyayên bêhn xweş, bibe mîna xezalekê, an jî çêlika askê!

# ÎŞAYA

*Pêşgotin*

Îşaya di zimanê Îbranîtî de di wateya "Xudan dê xelas bike" de ye. Ev gotina navê Pirtûkê ye, ji aliyekî jî kurtayiya Pirtûkê ye. Peyxamber Îşaya B.Z. di beşa duwemîn ya sedsala 8'an de li Orşelîmê jiya. Mirov dikare pirtûkê mîna sê beşên bingeh cuda bike:

1.Beşên di navbera 1-39'an de dema gef û fortên Asûrên xwurt ên ku ji cîranê xwe qiraletiya Cihûda ya ku li başûr e re xwarine têdighîne. Îşaya dît ku gefa rasteqîn ya ku berê xwe daye Cihûdayê ne hêza serkeft ya Asûr, lê gunehê gel, li dijî Xwedê rabûna wan û ji Xwedê re ewlenebûna gelê Cihûda ye. Peyxamber gelê Cihûdayê, bi gotin û kirinên bi bandor, bangî rasteqînî û dadiyê dike. Wan îkaz dike, dibêje ku ger guh nedin Xwedê, dê bêtarî dev ji wan bernede. Îşaya dema ku dê di hemûya dinê de aşitî bibe û hatina qiralê mînak yê ku dê ji nîjada Dawid ve were jî, ji berê ve têgîhand.

2.Beşên di navbera 40-55'an de rewşa dîrokî ya ku diguhere nîşan dide. Paşî Asûriyan, Babîloniyên ku li herêmê bûne hêza serwer di B.Z. sala 586'an de Orşelîmê bi dest ve dixin û gelê wê sirgûnî Babîlê dikin. Peyxamber mizgîn dide ku dê Xwedê gelê xwe azad bike û şunda vegerîne Orşelîmê. Mijarê di van beşan de derdikeve pêşiyê ev e: Xwedê, Xudanê Serwer ê ku rê dide dîrokê ye û pêşniyarên wî yên dê bi navgîniya gelê xwe neteweyên din jî bi bereket bike hene.

3.Beşên di navbera 56-66'an de bangî yên ku ji sirgûnê vegeriyane Orşelîmê û ji yên ku di derheqê sozên ku Xwedê daye gelê xwe de dê bîne cîh ewleyiyê dixwazin re dike. Ya din xemên di derheqê rastî, dadî, li gor roja Sebtê kirinê de û di mijara duayê de tîne ziman. Bi kurtasî mezinahî û seretayiya Xwedê tête daxuyandin. Hemû îlahên din li ber Xwedê tenê pûtên bêcan in.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-12:6 | Îkaz û wadan |
| 13:1-23:18 | Bicezakirina Neteweyan |
| 24:1-27:13 | Xwedê daraziya dinê dike |
| 28:1-35:10 | Îkaz û wadên nû |
| 36:1-39:8 | Hîzkiyayê qiralê Cihûdan û Asûriyan |
| 56:1-66:24 | Îkaz û wadên dawîn |

*Xwedê gelê xwe îkaz dike*

1 Di rojên qiralên Cihûda Ûz-
ziya, Yotam, Ahaz û Hîzkiya
de, xewn û xeyala ku Îşayayê
lawê Amots di derheqê Cihûda û
Orşelîmê de dîtiye.
2 Ya ezmanno, guhdarî bikin û ya
erd, guh bide! ji ber ku XUDAN
got: Lawan xwedî kirim û mezin
kirim û ji min re bûn asê. 3 Ga xwe-
diyê xwe û ker jî afira xwediyê xwe
dizane; lê belê Îsraêl nizane, nete-
wa min guh nade. 4 Ax, ya netewa
bi sûc, netewa ku neheqiyê li xwe
kiriye, nîjada kesên ku xerabiyê
kirine, zarokên ji ser xwe ve çûne!
Wan dev ji XUDAN berdan, Pîrozê
Îsraêlê biçûk dîtin, xerîb bûn û bi
paş ve ketin. 5 Ma çima hûn bi zêde
kirina rêşaşiyê dixwazin dîsa bên
lêxistin? Serî bi tûmî nexweş, dil bi
tûmî birîndar e[1]. 6 Di lingên wî de,
ji binî heta serî, di wî de tenduristî
nîne; tenê birîn û kul û xetên ko-
tekên teze hene; vana nehatine der
kirin û nehatine pêçandin û bi rûn
ve nehatine nerm kirin. 7 Welatê we
bûye çol; bajarên we bi agir ve hati-
ne şewitandin; erdên we jî li ber we
neyarên we biyan wê dixwin û bûye
çol, dibê qey kesên biyan wê bi ser
û binî kirine. 8 Û qîza Siyonê, di rez
de mîna çadirekê, di bostanê xiyaran
de mîna holikek, mîna bajarek, ku
dora wê hatiye girtin hate berdan.
9 Ger XUDANê artêşan maweyek
zehf biçûk ji me re nehiştiba, em ê
bibûna mîna Sodomê, em ê wekî
Gomora bibûna.
10 Ya serwerên Sodomê, gotina
XUDAN guhdarî bikin; ya ne-
tewa Gomora, guh bidin zagona
Xwedê! 11 XUDAN dibêje: Ma
gellek qurbanên we çêbûne, çi
ji min re? Ez ji pêşkêşiyên be-
ranan, yên şewitandinê û ji bezên
heywanên xwurt têr bûm û ez ji
xwînên ganêr û berx û nêriyan
hez nakim. 12 Dema hûn bona ku
di hizûra min de xuyanî bibin ha-
tin, ma kî vêya ji destên we xwest
ku hûn pêlên xwe davêjin hewşên

1 Jibirveçûyî.

min? 13 Êdî pêşkêşiyên vala
neynin; buxur ji bo min tiştekî
mekrûh e; ez êdî li ber bangên
serê mehê û roja Sebtê û civaka
fesad û cejnê natebitim. 14 Ji ser
mehên we û cejnên we yî bijarte,
canê min dikerihe; li ser min bar
in, ez ji kişandina wan westiyam.
15 Û dema hûn destên xwe vekin,
ez ê çavên xwe ji we veşêrim;
dema hûn zehf duayan bikin jî
ez ê guhdarî nekim; destên we bi
xwînê ve tijî! 16 Xwe bişon, paqij
bibin, xerabiyên karên xwe ji ber
çavê min bavêjin; dev ji xerabî ki-
rinê berdin! 17 Hînî qencî kirinê
bibin; li dadiyê bigerin, ji yê ku
zordestiyê dibîne re rastiyê bikin,
mafê sêwî biparêzin, li doza jine-
biyê binêrin!
18 XUDAN dibêje: Niha werin û
em li doza xwe binêrin; ger sûcen
we mîna qirmiz bin jî dê mîna
berfê sipî bibin, ger mîna kêzika
qirmizê gewez jî bin, dê mîna hirî
sipî bibe. 19 Ger hûn bi xwestek
bin û guhdarî bikin, hûn ê tiştên
herî xweş yên welêt bixwin.
20 Lê belê ger hûn nexwazin û
asê bibin, dê şûr we bixwe û biqe-
dîne! Belê, devê XUDAN got.

*Bajarê Biguneh*

21 Bajarê dilsoz çawa bû fahîşe!
Ew bajar ku bi mafan ve tijî bû!
Di wê de dadî cîh girtibû, niha jî
yên mêrkuj. 22 Zîvê te bû gûhe-
sin, avê tevî xemra te kirine.
23 Serokên te asê, dizek jî şirîkên
wan; her yek ji bertîlê hez dikin û
li pêy xelatan diçin; mafê sêwî na-
din û doza jinebiyê nayê ber wan.
24 Ji ber vêya ye ku Xudan,
XUDANê artêşan, Bilindê Îs-
raêlê dibêje: Ox! Ez ê ji neyarên
xwe aramiyê bibînim û ji dijmi-
nên xwe tolê hildim. 25 Û ez ê des-
tê xwe, bi ser te ve bizîvirînim û
ez ê gûhesinê te bi tûmî tûmî
paqij bikim û ez ê hemû qe-
lanîkê te rakim. 26 Û mîna berê
ez ê serwerên te û mîna destpêkê
ez ê şîretkirên te şunda bînim
û paşî wê dê ji te re: Bajarê
rastiyê, bajarê dilsoz bête gotin.
27 Dê Siyon bi dadiyê û tobe-
kirên wê bi rastiyê xelas bibin.
28 Lê belê dê şikestina gu-
nehkaran û sûcdaran pev re
bibin û yên ku dev ji XU-
DAN berdane dê telef bibin.
29 Ji ber ku dê ji darberiyê ku
hûn bi xwestek bûn, şerm bikin
û dê ji bexçeyen ku we bijarti-
ne rûyê we sor bibin[1]. 30 Ji ber
ku hûn ê bibin mîna darberiyê
ku pelê wê diçilmise û bexçê
ku ava wê nîne. 31 Û dê zilamê
xwurt qitik û dê karê wî bibe
çirûsk û dê her du jî pev re
bişewitin û dê yekî ku bitefîne
tune be.

[1] Hûn bi ber fediyê bikevin.

*Çiyayê XUDAN*

Mîk 4,1-5

2 Gotina Îşayayê lawê Amots;
di derheqê Cihûda û Orşelîmê
de dît.
2 Û dê di rojên dawîn de wusa bibe
ku, di serê çiyayan de, dê çiyayê
mala XUDAN bête zeximandin û
ji giran, ber bi jor ve bilind bibe û
dê hemûyên gelan bi wê ve biheri-
kin. 3 Û dê pirr netewe herin û bi-
bêjin: Werin û em hilkişin çiyayê
XUDAN; mala Xwedayê Aqûp!
Û dê rêyên xwe hînî me bike û
em ê di rêyên wî de bimeşin. Ji
ber ku dê zagon ji Siyonê û gotina
XUDAN ji Orşelîmê derkeve. 4
Û dê ew di nava gelan de serwe-
riyê bajo û dê di derheqê gellek
netewan de biryarê bide û dê ew
şûrên xwe bikin hesinên qanikê
û rimên xwe jî bikin kêrên rezva-
nan; dê gel ji gel re şûr hilnede û
dê êdî hînî cengê nebin.
5 Ya mala Aqûp, werin ku em di
ronahiya XUDAN de bimeşin!

*Roja XUDAN*

6 Ji ber ku te dev ji netewa xwe,
dev ji mala Aqûp berda; ji ber
ku ew bi tiştên ku ji rojhilatê ve
hatine tijî, ew jî mîna Filistiyan
stêrknas û mîna zarokên biyanan
dest didin destên hev. 7 Û welatên
wan bi zêr û zîvan ve tijî û dawi-
ya xezîneyên wan nîne û welatên
wan jî bi hespan ve tijî û dawiya
erebeyên wanî cengê nîne. 8 Û
welatên wan bi pûtan ve tijî; ji
tiştê ku bi tilîkên xwe çêkirine, ji
karê destê xwe re peristinê dikin.
9 Û mirov xwar bû û kesê mêr
hate nizmkirin; ji ber vêya, tu ji
wan re neborîne! 10 Ji ber mezi-
nahiya XUDAN û ji ber dijwariya
hêrsa wî bikeve zinarê û di axê de
xwe veşêrê! 11 Dê bilind nêrîna
mirovan bête nizm kirin, xirûra
wî bête şikandin û di wê rojê de
tenê XUDAN bête bilind kirin.
12 Ji ber ku dê XUDANê ku
hêza wî têra her tiştî ye, li dijî
hemûyên bi xirûr û bilind û li dijî
hemûyên hatine bilind kirin û dê
ew bên nizm kirin 13 û dê li dijî
hemûyên darên erzê yên mezin
ên Lubnanê, yên ku bilind bûne
û li dijî hemû darberiyên Başanê
14 û li dijî hemû çiyayên bilind û
li dijî hemû girên ku bilind bûne
15 û li dijî her qûleyê û li dijî
her dîwarê ku hatiye zeximandin
16 û li dijî hemû keştiyên Tarşîşê û
li dijî hemû tiştên ku xweşik têne
xuyakirin, dê rojekî XUDANê
artêşan hebe. 17 Û dê bilindahi-
ya zilam bête xwar kirin û bilin-
dahiya mirovan dê bê nizm kirin
û di wê rojê de dê tenê XUDAN
bilind bibe. 18 Û dê pût bi tûmî ji
holê rabin. 19 Û dema XUDAN,
bona ku dinê bi hêz bihejîne rabe,
ji ber bilindahiya wî û ji ber dij-
wariya bilindahiya wî, dê mirov

bikevin şikeftên zinaran û qulên
erdê. 20 Dema XUDAN, bona
ku dinyayê bi hêz bihejîne rabe,
ji ber bilindahiya wî û ji ber dij-
wariya bilindahiya wî, dê mirov
bona ku bikevin şikeftên zinaran
û qelişên zinarên bilind, 21 wê
rojê, dê mirov pûtên xwe yên zêr
û pûtên xwe yên zîv, yên ku bona
peristinê ji wan re hatine çêkirin
bavêjin şevşevik û xiltan. 22 Des-
tên xwe ji mirovê ku hilma wî di
pozê wî de yî bikişînin! Ji ber ku
qîmeta wî çî ye?

*Li Orşelîmê tevliheví*

3 Ji ber ku a vay, bi hevgirî û çoyê
Xudan, XUDANê artêşan, bi
hemû nanê ku ji jiyanê re dibe hev-
gir û hemû ava wî; 2 egîd û zilamê
wî yê cengê; serwer û peyxamber
û remildar û kalepîr 3 û serpênci-
yî û zilamê birêz û şîretkirî û kar-
kerê zaniyar û sêrbazê bihuner ji
Orşelîmê û Cihûda ve radike. 4 Û
ez ê zarokan ji wan re bikim sero-
kan û dê zarokên biçûk li ser wan
serweriyê bajon. 5 Û netewe dê li
beramberî ji hev re û dê her kes ji
cîranê xwe re zulmê bikin; zarok
li dijî kalepîr û dê zilamê nizm li
hember yê birêz bi bêheyatî bikin.
6 Zilamek di mala bavê xwe de bi
gotina: Kincekî te heye, tu bibe
serwerê me û bila ew wêrane di
bin destê te de bibe ji birayê xwe
re bibêje û pê bigire; 7 dê zilam wê
rojê dengê xwe bilind bike û bi-
bêje: Ez nabim yê ku birînê bipêçe;
ji ber ku di mala min de nan nîne
û kinc nîne; hûn min nekin ser-
werê netewê! 8 Ji ber ku Orşelîm
lerizî û Cihûda ket; ji ber, bona ku
nêrîna mezin ya XUDAN bi hêrsê
ve bixe zimanên wan. 9 Dîmenên
wecê wan li dijî wan şahdeyiyê di-
kin û sûcên xwe mîna Sodomê bi
eşkeretî dibêjin, venaşêrin. Heyf
li canên wan! Ji ber ku xerabiyê li
xwe kirin. 10 Bona yê salih, dê jê
re bibe qencî, bibêjin; ji ber ku ew
ê berê karên xwe bixwin. 11 Wey
li yê xerab! Dê ji wî re bibe xerabî;
ji ber ku her destên wî çi kiribin,
dê jê re wusa bibe. 12 Lê netewa
min ji, zarokan jê re zulmê dikin
û pîrekan jî serweriyê jê re dikin.
Ya netewa min, yên ku rê nîşanî te
didin, rêya te çewt dikin û rêya ku
tuyê tê de bimeşe xera dikin.
13 XUDAN bona dawa kirinê ra-
dibe û ji bo ku daraziyê bide nete-
weyan disekine. 14 Dê XUDAN
bi kalepîrên netewa xwe û serokên
wê re dadgeriyê bike: Yên ku rez
xwarine û qedandine hûn in; malê
kesê perîşan[1] yên ku hatine tazî
kirin di xaniyên we de ne; 15 ma
ji we re çi dibe ku hûn tahdê li ne-
tewa min dikin û hûn wecê kesên
nizm didin pesnahiyê? Xudanê
artêşan XUDAN dibêje.

1 Xizan, hêjar, feqîr.

*Îkaza ji Pîrekên Orşelîmê re*

16 Û XUDAN got: Madem ku
qîzên Siyonê bi kubr in û histuyê
xwe berbi pêşiyê ve dirêj dikin û
çav dikin û dimeşin û dema dige-
rin xwe diloqînin û xelikên lingên
xwe diçingînin; 17 ji ber vêya dê
Xudan, bi gurîtiyê li ser serê qîzên
Siyonê bixe, o dê XUDAN cîhên
wanî veşartî veke. 18 Xweşikya
xelikên lingên wan û tor û hîvika
ku xemla wan e; 19 guharên wan
û bazinên wan û pêçikên wan;
20 sêpêyên eniya wan û zincîrên
lingên wan û kemberên pişta wan
û şûşeyên wan ên bêhnên xweş û
niviştan; 21 gustîlkan û xelikên
pozan; 22 kincên cejnê û rûberan
û şalan û kîsikan; 23 mirêkên des-
tan û qutikan û pêçekên seriyên
wan, dê wê rojê Xudan rake û
bavêje. 24 Û dê wusa bibe ku, ji
dêvla bêhna xweş bêhna gemar
û li dêvla kembera piştê ta û li
dêvla lulê porê seriyek bê por û
li dêvla kincên bi xemil qutikên
ji cilikan[1]; li dêvla xweşikiyê dê
dax bûn hebe. 25 Dê zilamên te bi
şûr û egîdên te di cengê de bike-
vin. 26 Û dê deriyê Siyonê axînê
bikişînin û şînê bigirin û dê bêkes
bimîne û di axê de rûne.

4 Û di wê rojê de dê heft pîrek
zilamekî bigirin û bibêjin: Em
ê nanê xwe bixwin û em ê kincên
xwe li xwe bikin; lê belê bila navê
te li ser me ve bête bang kirin;
şermezariya me ji me rake.

*Dê Şiva XUDAN ji Orşelîmê re*
*bereket û Xelasiyê bîne*

Yêr 23,5-6; Tsêf 3,12-15; Îşa 33,20-24

2 Wê rojê, dê şiva XUDAN
xweşik û mezin be û bona kesên
Îsraêlê, yên ku reviyane û xelas
bûne, dê mêwa erdê pirr qenc û
xweşik bibe. 3 Û gava Xudan pî-
sitiya qîzên Siyonê bişo û ji nava
Orşelîmê, xwîna wê bi ruhê dadi-
yê û ruhê şewitandinê paqij bike;
4 dê wusa bibe, yê ku li Siyonê
li pêy maye û li Orşelîmê hatiye
hiştin, ji her zilamê ku di nava yên
ku li Orşelîmê dijîn de hatiye ni-
vîsandin pîroz bête gotin. 5 Û dê
XUDAN li her şunwarê Çiyayê
Siyonê û li ser civînên wê, bi rojê
ewr û dû û şevê şewla agirê bi pêt
biafirîne; ji ber ku dê li ser hemû
mezinahiyê bibe rûber. 6 Û rojê
ji germiyê bona siyê û ji ber ba-
ranê û bahozê cîhê sitirînê û bona
rûpiştê bibe çardaxek.

*Murxa Rez*

Zeb 80,9-17; Yêr 2,21; Met 21,33-44

5 Ez bona rezê evîna xwe, sit-
rana evîna xwe bixwînim. Li
girekî erdê wê bi berdar, rezê evî-
na min hebû. 2 Û wê ajot û kevirên
wê neqand û mêwên bijartî tê de

1 Yanê çûl.

çikand û di nava wê de qûleyekê
çêkir û di hundirê wê de mahse-
reyekê kola û bona ku tirî bide li
bendê ma, lê belê tiriyê bejî da.
3 Û niha, ya yên ku li Orşelîmê
rûdinin û mêrên Cihûda, ez rica
dikim, di nava min û rezê min de
daraziyê bidin! 4 Tiştê ku di rezê
xwe de nekirime û hewce dike ku
ez jê re bikim hîn çi heye? Ma
çima ez bona ku tirî bide li ben-
dê bûm, lê belê wê tiriyê bejî da
min? 5 Û niha ez ê tiştê ku ji rezê
xwe re bikim, ji we re bibêjim: Ez
ê çîtikê wê rakim û dê wê bixwin
û biqedînin; ez ê dîwarê wê xera
bikim û dê wê di bin lingan de bie-
ciqînin 6 û ez ê wê xerabe bikim;
dê neyê terişandin û dê neyê xepi-
randin û dê di wê de qirş û kelem
derkevin[1] û bona ku di ser wê de
baranê nebarînin, ez ê fermanê
bidim ewran jî. 7 Ji ber ku rezê
XUDANê artêşan mala Îsraêlê ye
û şitilê ku dilê wî şa dikin mêrên
Cihûda ne û li benda dadiyê ma
û a vay, zordestî û rastî sekinî û a
vay, hawar.

*Xerabiya Gelê Îsraêl*
Mîk 2,1-5; Amos 6

8 Wey li serê kesên ku heta cîh
nemîne xanî tevî xaniya dike û
zevî bi zeviyan ve yek dike! Û
yên ku di hundirê welêt de rû-
dinin, tenê hûn man! 9 XUDANê
artêşan, bi guhên min ve da
bihîstin û dibêje: Bi rastî dê pirr
xanî, xaniyên mezin û qenc tenha
bimînin, dê yê ku di hundirê wan
de rûnin tune bin! 10 Ji ber ku dê
rezekî deh donim, batekî[2] bide û
homerek[3] tov, tenê dê efayekê[4]
bide. 11 Wey li serê yên bona
ku li pêy araqê bazdin sibehê zû
radibin, şevê heta dema dereng,
heta ku xemr wan sor dike şahiyê
dikin! 12 Û di ziyafetên wan de
çenk û santûr, tef û zurne û xemr
hene; lê belê bala xwe nadin ki-
rina XUDAN û li karê destên wî
nanihêrin.

13 Netewa min, ji ber vêya, ji ber
kêmasiya zanînê hate sirgûn kirin
û zilamên wê, yên birêz ketin xe-
layê û gelê wan ji tîbûnê hişk bûn.
14 Ji ber vêya, warê miriyan qiri-
ka xwe fireh kir û bêpîvan devê
xwe vekir û pesnahiya wan û devî
galegala wê gelê wê û yê ku di
nava wan de dilşa dibe û dicoşe,
dadikeve wir. 15 Û kesê nizm
xwar bû û mêrê xwurt hate nizm
kirin û çavên yên ku bi xirûr in
hatin nizm kirin; 16 lê belê XU-
DANê artêşan di nava dadiyê de
bilind bû û Xwedayê ku Pîroz e,
di nava rastiyê de hate pîroz kirin.

1 Biqedin, vebibin, an jî: Hêşîn bibin.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Li rasteka menan binêrin.
4 Li rasteka menan binêrin.

17 Dê wê demê, berxik mîna ku
di mêrgên xwe de bin biçêrin û dê
xizan, cîhên dewlemendan yên ku
tenha mane bixwin.
18 Wey li serê yên ku fesadiyê bi
tayê derewan û sûcê mîna ku bi
kindira erebê bikişînin li pêy xwe
dibin! 19 Ew dibêjin: Bila bile-
zîne, karê xwe zû çêbike ku em
bibînin û bila şîreta Pîrozê Îsraêlê
nêzîk bibe û were ku em bi wê bi-
zanibin! 20 Wey li serê yên ku ji
xerab re dibêjin qenc, ji qenc re
dibêjin xerab; yên tariyê datînin
dêvla ronahiyê, ronahiyê datînin
dêvla tariyê; yên ku tahliyê datînin
dêvla şêrîniyê û şêrîniyê datînin
dêvla tahliyê! 21 Wey li serê yên
ku di çavên xwe de zaniyar in û
xwe jîr dibînin! 22 Wey li serê yên
ku di vexwarina xemrê de egîd in
û di tevlîhevkirina vexwarinê de
dijwar in; 23 yên ku bona bertîlê,
kesê xerab biheq derdixin û heqê
zilamê biheq ji destên wan digirin
û distînin!
24 Ji ber vêya ye ku, çawa zi-
manê agir firêzê bixwe û biqedî-
ne û çawa ku gîhayê hişk di nava
pêtan de têk biçe, dê reha wan jî
wusa birêzê û çîçega wan jî mîna
tozê bi ber ba bikeve; ji ber ku
zagona XUDANê artêşan, ji ser
xwe avêtin û gotina Pîrozê Îsraêlê
biçûk dîtin. 25 Li dijî netewa wî,
ji ber vêya hêrsa XUDAN sor bû
û destê xwe berbi wan dirêj kir û
li wan xist û çiya dilerizin û laşên
wan di nava kuçan de mîna sergo
disekinin. Tevî vana hemûyan,
hêrsa wî şunda venegeriya, lê belê
destê wî hîn dirêj kirî, disekine.
26 Û dê bona neteweyên li dûra ne,
direwşê biçikîne û ji serê erdê, bona
ku bangî wan bikin, dê bifikîne û a
vay, dê bi lezî zû werin. 27 Û dê di
nav wan de westayî û tilpekîbûyî
tune be; dê tu kes şewş nebe û ra-
nekeve; dê kemberên piştan neyên
vekirin û benikên çarixan neyên
qetandin; 28 tîrên wan tûj û rimên
wan tim amade ne; dê neynûkên
hespên wan kevirên çeqmaqê û te-
kerên erebeyên wan jî bahoz bên
guman kirin; 29 gumeguma wan
mîna şêra mê ye û dê mîna şêrên
ciwan bigurmin û dê bigurmin û
nêçîrê bigirin û wê bibin û dê xe-
lasker jî tune be. 30 Û wê rojê, dê
li hember wan mîna gurmîniya
behran bigurmin û ger yek li giravê
binêre, a vay, tarî û tengasî hene; di
ewrên wê de ronahî tarî bûne.

*XUDAN bangî Îşaya dike*

6 Sala ku qiral Ûzziya mir, Xu-
dan li ser textekî bilind û me-
zin rûniştî dîtim û dawên wî, pe-
restgehê dadigirtin. 2 Ji wî jor ve
Seraf disekinîn; şeş bazikên her
yekî hebûn; bi du heban lingên
xwe dunuxumandin û bi du he-
ban jî wecê xwe dunuxumandin û
bi du heban jî difiriya. 3 Û yekî

bangî yê din dikir û digot: XUDANê artêşan pîroz e, pîroz e, pîroz e; hemû dinya bi mezinahiya wî ve tijî ye! 4 Û ji dengê yê ku bang dikir, bingehên şêmûgê dilerizîn û xanî bi duh ve tijî bû. 5 Û min got: Wey li serê min! Ji ber ku ez helaq bûm; ji ber ku ez zilamek lêvên wî mindar im û ez di nava neteweyek lêv mindar de rûdinim; ji ber ku çavên min Qiral, XUDANê artêşan dîtin.

6 Û yek ji Serafan berbi min ve firiya û di destê wê de pêt hebû; bi gasikê[1] wê ji ser pêşkêşîgehê rahiştibû 7 û bi wê li devê min da[2] û got: A vay, ev li lêvên te ket û fesadiya te hate rakirin û li sûcê te hate borîn! 8 Û dengê XUDAN bihîstim: Ez kî bişînim û dê bo me kî here? digot. Û: A vay ez, min bişîne! gotim. 9 Û got: Here û ji wê netewê re bibêje: Her ku hûn dibihîzin, bibihîzin, lê belê fêhm nekin û her ku hûn dibînin bibînin, lê belê nizanibin! 10 Dilê vê netewa bezgirtî[3] bike û guhên wê giran bike û çavê wê bigre ku bila bi çavên xwe nebînin û bi guhên xwe nebihîzin û bi dilên xwe fêhm nekin û venegerin û şîfa nebînin! 11 Û gotim: Heta çi wextî ya XUDAN? Û got: Heta ew wextê ku, dê bajêr wêran û bêkes û xanî bêmirov bimînin û erd bitûmî bitûmî bibe çol 12 û dê XUDAN zilaman bavêje dûr ve û dê di nava welêt de cîhê ku vala hatine hiştin zehf bin. 13 Û di welêt de ji dehî yek bimîne jî; ew ê dîsa bête daqurtandin; mîna darê menengûçê ya dalîta wê maye û darberiyê bên qulupandin; dalîta wê nîjada pîroz e!

*Xwedê ji bo Bawerkirinê bangî Orşelîmê dike*

7 Û wusa bû ku, di rojên qiralê Cihûda Ahazê ku lawê Yotamê Ûzziya yî de, qiralê Sûriyê[4] Retsîn û qiralê Îsraêlê Pekahê lawê Remalya, li dijî Orşelîmê bona cengê derketin, lê belê hêz neanîn ku li hember wê cengê bikin. 2 Û ji mala Dawid re, gotina: Sûriye bi Efrayîm re yek bû hate gîhandin. Û çawa ku darê daristanê li ber ba bilerize, dilê wî û dilê netewê jî wusa lerizî.

3 Û XUDAN ji Îşaya re got: Li serê rêya ava burka jorîn, li suka zeviya perpitandinê, bona pêrgîniya Ahaz, tu, tevî lawê xwe Şear-Yaşûb[5], niha derkevin; 4 jê re bibêje: Xwe biparêze û hiş be; ji van her du teriyan[6] û ev her du pariyê êzingê nîv şewitiye û duh

1 Maşe.
2 Bi wê li devê min xist.
3 Qelew, an jî: Hişk.
4 Aramê.
5 Dê maweyek (mayeyek) vegere.
6 Doçik.

dikin, ji hêrsa sor ya Retsîn û Sûri-
yê û lawê Remalya metirse û bila
dilê te şewş nebe! 5 Madem ku
Sûriye, Efrayîm û lawê Remalya,
dibêjin: 6 Em li dijî Cihûda rabin
û çavê wê bitirsînin û di wê de
bona xwe qulekî vekin û em qira-
lekî deynin ser wî, lawê Tabeel, bi
qiraltî deynin ser wî, ji bona te xe-
rabiyê danîn! 7 Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Dê ev kar nesekine û
wusa nebe! 8 Ji ber ku serê Sûriyê
Şam, serê Şamê jî Retsîn e û dê di
nava şêst û pênc salî de Efrayîm
bişkê û ji netewebûnê derkeve
9 û serê Efrayîm Samîriye û serê
Samîriye jî lawê Remalya ye. Ger
hûn baweriyê neynin, hûn nikarin
ewle bibin!

*Nîşanek XUDAN: Îmanûêl*

Met 1,18

10 Û XUDAN dîsa bi Ahaz re axifî
û jê re got: 11 Ji XUDAN Xwedayê
xwe, bona xwe nîşanekê bixwaze;
dixwaze bila li balûpalan be, an jî
li jor, li bilindahiyan be, tu bixwa-
ze. 12 Lê belê Ahaz: Ez naxwazim
û XUDAN naceribînim! got. 13 Û
peyxamber got: Ya mala Dawid,
niha guhdarî bikin! Ma we mirovan
behicandin, qey ev bona we tiştekî
hindik e ku hûn dixwazin Xwedayê
min jî bibehicînin? 14 Dê bona we
yekê, XUDAN bi xwe nîşanekê
bide we: A vay, dê qîz ducanî bibe
û lawekî bîne dinê û dê navê wî
Îmanûêl[1] deyne. 15 Dema yê xerab
bavêje û qenciyê hilbijêre, dê rûnê
nivîşk û hungivê bixwe. 16 Ji ber,
berî ku lawik yê xerab bavêje û yê
qenc hilbijêre; dê erdên her du qi-
ralên ku tu ji wan ditirse vala bibin.
17 Dê XUDAN rojan bîne ser te û
ser netewa te û ser mala bavê te,
rojên wusa ku, ji roja ku Efrayîm ji
Cihûdayê cuda bûyiyê nehatine; dê
qiralê Asûrê bîne.
18 Û dê ew roja wusa bibe ku, dê
XUDAN ji mêşa ku di dawiya
çemên Misirê de ye re û ji moza
ku li warê Asûrê ye re, bifikîne.
19 Û dê werin û gişt di zaxorên
geliyan de û di derizkên zinaran
de û di hemû çîtên kelem de û di
hemû mêrgan de dakevin.
20 Ew roj XUDAN dê bi gûzana
ku ji wêdeya Feratê ve hatiye
kirê kirin, bi qiralê Asûrê re serî
û mûyên bedenê we kur bike û dê
riyê we jî kur bike.
21 Û dê wê rojê wusa bibe ku, zi-
lamek dê çêlekek ciwan û cotekî
mîh xwedî bike. 22 Û dê wusa
bibe ku, ji zêdeyiya şîrê ku didin,
dê rûnê nivîşk bixwin; ji ber her
kesên ku di nava welêt de hatine
hiştin, dê rûnê nivîşk û hungiv
bixwin.
23 Û dê ew roja wusa bibe ku, her
derê hezar mêwê ku di qîmeta he-
zar zîvî de yî tê de hene, bibin cihê

1 Xwedê bi me re.

qirşik û keleman. 24 Dê mirov bi
tîran û bi kevanê bên li wê derê, ji
ber ku hemûya welêt bibe qirşik
û kelem. 25 Û hemû çiya, ku bi
kulbê dihatin serûbinî kirin, tuyê
ji tirsa qirş û keleman newêre ku
here wir; lê belê dê bona şandina
gayan û di bin lingên mîhan de
mayînê hêja be.

*Êrîşa Qiralê Asûrê*

8 Û XUDAN ji min re got: Ji
xwe re texteki mezin rahêle
û bi pênûska mirov, li ser gotina:
Maher-Şalal-Haş-Baz[1] binivîsî-
ne! 2 Û bona ku bila şahdeyiyê
bikin, ez ê Ûriyayê kahîn û Zekar-
yayê lawê Yeberakya ji xwe re bi
şahdeyên dilsoz in bikim! 3 Û ez
ketim cem peyxambera pîrek[2] û
ew ducanî ma û laweki anî dinê.
Û XUDAN ji min re got: Navê
Maher-Şalal-Haş-Baz lêke! 4 Ji
ber lawik, berî ku hînî bang kirina
dayê û bavo bibe, dê dewlemen-
diya Şamê û malê Samîriyê, yê
talanê ji pêşiya qiralê Asûrê ve
bête birin.
5 Û dîsa XUDAN careki din bi
min re axifî û got: 6 Madem ku
ew netewa, avên Şiloahê yên
ku bêdeng diherikin biçûk dîtin
û bi Retsîn û lawê Remalya ve
dilxweş dibin; 7 bo vê yekê, a vay
Xudan avên Feratê yên xwurt û
pirr, qiralê Asûrê û hemû mezina-
hiya wî, niha bi ser wan ve dixe û
dê ji hemû cîhên xwe bilind bibe
û bi ser hemû qeraxên xwe ve
biçe. 8 Û Cihûda bigire bin xwe
û bi ser ve biçe û ji hundirê wê ve
derbas bibe û bigihêje heta qiri-
kê û şidîna baskên wê dê firehiya
welatê te dagire, ya Îmanûêl!
9 Ya neteweno, bigurmin û bişkên!
Û ya hemûyên ku li welatê dûr in,
guh bidin; li xwe bikin û bişkên;
li xwe bikin û bişkên[3]! 10 Di nava
hev de şîretan bidin hev û dê li
valahiyê bête derxistin; gotinekê
bibêjin, dê nesekine; ji ber ku
Xwedê bi me re ye.

*Îkaza XUDAN*

11 Ji ber ku, dema destê XUDAN,
bi xurtî li ser min bû, bi vî awayî
ji min re axifî û di rêya vê netewê
de nemeşînê hînî min kir û got:
12 Ji her tiştên ku ev netewe jê
re dibêjin fitne, hûn nebêjin fitne;
ji yê ku ew jê ditirsin, hûn me-
tirsin û jê çavên xwe metirsînin!
13 XUDANê artêşan, yê ku hûn
ê pîroz bikin ew e û yê ku hûn
ê jê bitirsin, bila ew be û bila yê
ku çavên we jê tirsiyane ew be!
14 Û dê ew bibe pîroz; lê belê dê
ji du malên Îsraêlê re bibe kevirê

[1] Talan baz dide, yaxme bi lezî dimeşe.
[2] Nebiye.
[3] Kincên xwe, an ji çekên xwe girê bidin.

xijbûnê û zinara tilpekîbûnê û ji
yên ku li Orşelîmê rûdinin re jî
bibe feq û dafik. 15 Û dê pirr kes
ji nava wan tilpekî bibin û bikevin
û bişkên û dê bikevin dafikê û bên
girtin.
16 Di nava şagirtan de şahdeyiyê
girê bide û zagonê bi mor bike.
17 Û ez ê li benda XUDANê
ku wecê xwe ji mala Aqûp ve
vedişêre bim û hêviya xwe bi wî
ve girê bidim. 18 A vay, ez û za-
rokên ku XUDAN dayîne min,
em ji aliyê XUDANê artêşan, yê
ku li Çiyayê Siyonê rûdine, di Îs-
raêlê de nîşan û nuwaze ne.
19 Û ger ji we re: Bi cinwan û
nêrîngirê ku kustûpistê dikin û di
ber xwe de dipeyivin bişêwirin
bibêjin; ma neteweyek, bona xwe
bi Xwedayê xwe naşêwire? Ma
bona yên ku dijîn, mirov bi mi-
riyan re dişêwire? bibêjin. 20 Bi
zagon û şahdeyiyê! Ger li gor vê
gotinê nebêjin, dê rastî, bona wan
nebe şewla berbangê. 21 Û dê bi
zehf tengasî û birçîtiyê ji hundirê
wê ve derbas bibin û dê wusa bibe
ku, dema birçî bibin, dê hêrs bibin
û dê tevî qiralên xwe ji Xwedayên
xwe re naletê bikin û wecên xwe
berbi jor ve rakin. 22 Û dê li erdê
binêrin û a vay, tengasî û tarî,
tarîbûna hundirîn ya tahl! Û dê
berbi reştariyê ve bên ajotin.

*Mizgîna Serokê Aştiyê*

Met 4,12-17; Lûq 1,31-33

9 Lê belê dê bona kesê ku êşê
kişandiye, tarîbûn tune be. Di
demên kevnare de warê Zebûlûn
û warê Naftalî zebûn kir; lê belê
di rêya behrê de, wî aliyê Urdunê,
Celîlêya gelan di dema dawîn de
birûmet kir[1]. 2 Netewa ku di tariyê
de dimeşe ronahiyek mezin dît; li
ser yên ku di warê mirinê de rû-
dinin, ronahiyek biriqiya. 3 Te gel
zêde kir û kêfxweşiya xwe zêde kir;
kêfxweşiya di dema oraqê de çawa
be, dema talanê par dikin çawa
kêfxweş dibin, ew li ber te wusa
kêfxweş dibin. 4 Ji ber ku te nîrê
wî yê ku jê re bûbû bar û darê ku
li pişta wî ye, çoyê kesê ku zulmê
lê dikê, mîna di roja Midyanê de
yî şikenand. 5 Ji ber ku hemû gîz-
meyên kesên ku di cengê de gîzmê
li pê dikin û kincê ku di xwînê de
gemiriye dê bên şewitandin, bibin
xwarina agir. 6 Ji ber ku ji me re
zarokek bû, lawikek ji me re hate
dayîn û dê serokantî li serpiyên wî
bin û navê wî bi gotinên: Şîretkirê
Nuwaze[2], Xwedayê Bihêz, Bavê
Abadînê, Serokê Aştiyê bête bang
kirin. 7 Ew ê li ser texta Dawid û li
ser welatê wî, bona ku ji niha heta
abadîn bi rastî û heqî zexim kirin
û piştgirî kirinê dê ji zêdebûna se-
rokantî û xweşiya wî dawî nebe.

1 Şên kir.

2 Şîretkirê şaşkir, ecêbmayî, an jî: Yê mat mayî dike.

Dê xîreta XUDANê artêşan, vêya
çêbike.

*Hêrsa XUDAN ji Îsraêlê re*

8 Xudan bona Aqûp gotinekê şand
û daket ser Îsraêlê 9 û hemû nete-
we, yên ku li Efrayîm û Samîriyê
rûdinin, yên ku bi kubr û bi xirûra
dil: 10 Kerpîç ketin, lê belê em ê
bi kevirên teraşkirî çêbikin; darên
cemîzê hatin jêkirin, lê belê em ê
darên erzê deynin cîhên wan digo-
tin, dê fêhm bikin. 11 Ji ber vêya,
dê XUDAN neyarên Retsîn li dijî
wî rake û dijminên wî, 12 ji pêşiyê
Sûriyan û dawiyê jî Filistiyan li
dijî wî rake û dê bi tijebûna gepê
Îsraêlê bixwin. Tevî vana hemûyan
hêrsa wî şunda venegeriya, lê belê
destê wî dirêj kirî sekiniye.
13 Lê belê netewe venegeriya yê ku
li wan dixe û li XUDANê artêşan
negeriyan. 14 Û ji bo vê yekê, dê
XUDAN serî û teriyê, qamir û darê
xurmê rojekê ji Îsraêlê jêke û ba-
vêje. 15 Kalepîr û zilamê birêz, serî
ew e û peyxamberê ku derewan fêr
dide, doçik ew e. 16 Ji ber, yên ku
rê nîşanî vê netewa didin, wê rêşaşî
dikin û zilamên ku rê ji wan re tête
nîşan kirin, tên daqurtandin. 17 Ji
ber vêya dê Xudan bi xortên bijartî
kêfxweş nebe û dê heyfa wî li sêwi-
yên wan û jinebiyên wan neyê[1]; ji
ber ku gişt fasiq in, yên ku xera-
biyê dikin in û her dev ehmeqiyê
dibêje. Tevî vana hemûyan, hêrsa
wî şunda venegeriya, lê belê destê
wî hîn dirêj kirî sekiniye.
18 Ji ber ku xerabî mîna agir
dişewitîne; kelem û qirşikan dixwe
û diqedîne û li daristanê bi cîhên
pihêt dikeve û sitûnek duh bi girî
bilind dibe. 19 Welat, bi xezeba
XUDANê artêşan şewitî û tu dibêje
qey netewe xwarina agir in; tu kes
birayê xwe naparêze. 20 Û dê yek
ji aliyê rastê ve rahêle û birçî bimî-
ne û li aliyê çepê bixwe, lê belê têr
nebe; dê her kes goştên milên xwe,
21 Manaşşe dê Efrayîm û Efrayîm
jî dê Manaşşe bixwe; vana dê pev
re li dijî Cihûda bimeşin. Tevî vana
hemûyan, hêrsa wî şunda venege-
riya, lê belê destê wî hîn dirêj kirî
sekiniye.

10 Wey li serê yên bona ku
bila jinebiyan ji xwe re
bikin nêçîr û sêwiyan talan bikin,
xizanan ji dadiyê şaş bikin û mafê
kesên zebûnê ji netewa min e xesp
bikin, 2 fermanên neheq derdixin
û nivîskarên ku tiştên çewt dini-
vîsîn in! 3 Ma di roja jimartinê û
ji xerabiyata ku ji dûr ve were de
hûn ê çi bikin? Bona dîtina alîka-
riyê hûn ber bi kê bazdin? Û hûn
ê malên xwe deynin ku? 4 Lê tenê
dê di bin dîlan de hilweşin û di

[1] Ji wan re dilê xwe neşewitîne, an jî: Li ber wan nekeve.

şêrê ciwan û ganêrê xwurt li cem
hev bin û dê lawikek biçûk wan
bajo. 7 Û dê hirç û çêlek pev re
biçêrin; dê çêlikên wan pev re
rakevin û şêr mîna ga ka bixwe.
8 Û dê zarokê pêsîrê li ser qulla
marê reş bilîze û zarokê ku ji şîr
ve hatiye qut kirin, dê destê xwe
deyne ser quntara margîskê. 9 Dê
di hemû çiyayê minî pîroz de xe-
sarê nedin û helaq nekin; ji ber ku
çawa av behrê digirin, dê dinya jî
bi zanîna XUDAN ve tijî bibe.

*Dê Sirgûn şunda vegerin*

10 Û dê ew roj wusa bibe ku, gel li
reha Îşay, ya ku bona neteweyan bi
alitî sekiniye bigerin û dê cîhê ku
ew aramiyê dibîne bi mezintî be.
11 Û dê ew roj wusa bibe ku, Xu-
dan bona ku maweyên ji Asûrê û
ji Misirê û ji Patrosê û ji Kûşê û
ji Elamê û ji Şînarê û ji Hamatê
û ji giravên behrê mayîne xe-
las bike, dê cara duwemîn destê
xwe dirêj bike. 12 Û dê bona
neteweyan alekek bilind bike û
dê sirgûnên Îsraêlê bide hev û ji
çar aliyên erdê zilamên Cihûda
yên ku belav bûyîne, bînin cem
hev. 13 Dê çavnebariya Efrayîm
jî nemîne û yên ku tengasiyê li
Cihûda dikin, dê bên jêkirin û
avêtin; dê Efrayîm çavnebariyê li
Cihûda meke û Cihûda tengasiyê
li Efrayîm meke. 14 Û dê li ali-
yê rojavayê bifirin û xwe bavêjin
piştên Filistiyan; pev re lawên
rojhilatê dê talan bikin; dê destên
xwe bavêjin ser Edom û Moabê
û lawên Ammon, dê gotinên wan
guhdarî bikin. 15 Û dê XUDAN
li Misirê, bi tûmî zimanê behrê
tune bike û li ser Feratê, dê destê
xwe tevî bayê xwe yî diqemirîne
kil bike û dê lêxe û bi heft robarî
wê par bike û mirovan bi çaroxên
wan ve derbas bike. 16 Û roja ku
ji warê Misirê ve derket, mîna ku
ji Îsraêlê re bû, dê bona mawe-
yên li pêy netewa wî mane rêyek
ji Asûrê ve mezintir hebe.

*Gelê Îsraêlê ji XUDAN re şikir dike*

Yêr 31,10-12; Tsêf 3,14-15; Zeb 98

12 Û tuyê wê rojê bibêje: Ya
XUDAN, ez ji te re şikir
dikim: Ji ber ku tu li hember min
hêrs bûbû, lê belê hêrsa te zivirî
û te xemrevîniyê li min kir. 2 A
vay, Xwedê xelasiya min e; ez ê
ewle bibim û bêzar nebim; ji ber
ku XUDAN[1] hêza min û qesîdeya
min e û ji min re bû xelasî. 3 Ji
ber vêya, hûn ê bi kêfxweşiyê ji
bîrên xelasiyê avê bikişînin. 4 Û
hûn ê wê rojê bibêjin: Şikiryê ji
XUDAN re bikin, bangî navê wî
bikin, di nava netewan de agahiya
karên wî bikin, bîranîna bilind ki-
rina navê wî bikin! 5 Ji XUDAN
re bistirên; ji ber karên ku pesna-

1 An jî: Yah Yahve.

hiyê bidin çêkirin; bila di hemûya
dinê de ev bête zanîn! 6 Ya tu, yê
ku li Siyonê rûdine, bang bike û
biqêre! Ji ber ku di hundirê te de
Pîrozê Îsraêlê mezin e.

*Dê XUDAN Babîlê biceza bike*

13 Barê Babîlê, Îşayayê lawê
Amots wê dît:
2 Alê li ser çiyayê tazî biçikînin,
bi dengê bilind bangî wan bikin,
destên xwe kil bikin ku, bila ji de-
riyên esilan re derbas bibin! 3 Ji
kesê ku tirxan kirime re, min emir
da, belê, ji ber hêrsa xwe bangî
egîdên xwe, yên ku ji mezinahi-
ya min şahiyê dikin kirim. 4 Li
çiyayan galegala ajaweyan, mîna
galegala neteweyek! Galegala
tevliheviya welatê gelên ku li cem
hev civiyane! XUDANê artêşan,
bona cengê sehêtiyê li artêşê dike.
5 Bona ku hemû welatê wêran
bike, XUDAN û çekên xezeba
wî, ji warekî dûr, ji serê ezmanan
ve tên.
6 Biurin! Ji ber ku roja XUDAN
nêzîk e; ji aliyê Yê ku hêza wî
têra her tiştî ye, mîna têkçûnekê
tê! 7 Dê ji ber vêya hemû dest
sist bibin û dilê her mirovî buhule
8 û dê şaş bibin û dê êş û keser bi
wan ve bigire; dê mîna pîreka ku
diwelidîne janê bikişînin; bi şaş û
mat mayîbûnê dê li hev binêrin;
wecên wan, wecê agir. 9 Bona
ku welêt bike çol û ji hundirê
wê, yên sûcdar helaq bike, a vay,
roja XUDAN, roja ku dilovaniyê
nake, bi xezeb û hêrsa sor ve tê.
10 Ji ber ku dê sitêrkên ezmanan
û komên wanî sitêrkan ronahi-
yên xwe nedin; dema roj hilê dê
reş bibe û heyv şewla xwe ya ku
dibiriqe nede. 11 Û ez ê ji ber xe-
rabiya wan dinê û ji ber fesadiyên
wan, xeraban biceza bikim û ez
ê dawî bidim kanciya qurreyan û
ez ê xirûra kesên ku tirsehêz in,
nizm bikim. 12 Ez ê zilamekî tenê
ji zêrê xas, ji zêrê safî yên Ofîrê
kêmdîtî[1] bikim. 13 Ji ber vêya,
ez ê ezmanan bilerizînim û di
xezeba XUDANê artêşan de, di
roja wî ya hêrsa sor de dê dinya ji
cîhê xwe ve bilîze. 14 Û dê wusa
bibe, mîna xezala ku bi pêy wê
hatiye ketin û mîna mîhên, kesekî
nîne ku wan bicivînin, dê her kes
berî bidin netewên xwe û birevin
welatê xwe. 15 Û dê gewda her
zilamê ku bi dest ve bikeve, bête
qul qulî kirin û her zilamê ku bête
girtin, dê bi şûr ve bikeve. 16 Û dê
zarokên wan jî li ber çavên wan li
erdê ve bên xistin; dê malên wan
bên talan kirin û jinên wan bên
xera kirin.
17 A vay, ez ê li dijî wan Medan
hişyar bikim, bona wan qîmeta
zîvê nîne û bi zêran ve dilên wan
xweş nabin. 18 Û dê bi kevanan

[1] Bêzin.

ciwanan li erdê bixin û dê heyfa
wan li berdariya rehmê neyên.
19 Û Xwedê, mîna ku Sodom û
Gomora xera kir, dê mezinê wela-
tan, Babîla xemla xirûra Kildani-
yan jî wusa bibe. 20 Dê abadîn
tê de neyê rûniştin û ji nifşe heta
nifşeyan nebe cîh û dê bedewî[1]
li wir çadirê daneyne û dê şivan
keriyên xwe li wir mexel nekin.
21 Lê tenê dê li wir, heywanên
bejî yên çolê rakevin û dê xani-
yên wan bi kundan ve tijî bin û
dê heştirme li wir cîh bigirin û dê
bizinên hov li wir bilîzin. 22 Û di
qesrên wan de gur û di kelehên
wanî xweşik de çeqel biûrin; ha-
tina demê nêz e û dê rojên wan
direj nebin.

14 Ji ber ku dê dilê XUDAN
bi Aqûp ve bişewite û dê
dîsa Îsraêlê hilbijêre û wan dey-
ne ser erdên wan û dê yê biyan
bi wan re yek bibe û dê bi mala
Aqûp ve bizeliqin. 2 Û dê netewe
bi wan bigirin û wan bînin cîhên
wan û dê mala Îsraêl, li ser erdê
XUDAN, wan ji xwe re bi kole û
cariye bûnê bikin mal û dê yên ku
xwe sirgûn kirine, sirgûn bikin û
dê ji yên ku zulmê li xwe kirine re
bibin serwer.
3 Û dema roja ku tu ji êş û keserê
û ji xizmeta giran ya ku bi te di-
din kirin XUDAN aramiyê bide te
dê wusa bibe ku, 4 tuyê li ser qi-
ralê Babîlê vê metholêkê biaxife
û bibêje: Yê ku zulmê dikir, çawa
tune bû! Bajarê wî yî zêrîn tune bû!
5 XUDAN çoyê xeraban û gopalê
serweran şikenand; 6 ew gopal ku
bi xezeb û bi derba her timî li nete-
wan xist, bi hêrsê, bi cefaya ku kes
nikare têkeve ber bû serwerê nete-
weyan. 7 Hemû dinya di aramiyê
de û bêdeng in; nişka ve bi sitran-
dinê dicoşin. 8 Ji ber te, tevî darên
erzê yên Lubnanê serwî jî kêfxweş
dibin: Ji dema ku te li erdê ve rast
kirine, dibêjin li dijî me birrînvanek
dernehat. 9 Warê miriyan, bona ku
pêrgîniya hatina te bike, ji binê xwe
ve dikele; bona te miriyan, hemû
mezinên dinê hişyar dike; hemû qi-
ralên gelan ji textên wan ve rakir ser
pêlan. 10 Dê gişt bersivê bidin te û
bibêjin: Ma tu jî mîna me lawaz bû?
Tu jî bû mîna me? 11 Mezinahiya te
û galegala sentûrên te ji warê miri-
yan re hate daxistin; gur di bin te de
li erdê ve hatin rast kirin û gur ser te
duxumînin.
12 Ya sitêrka ku dibiriqe, lawê
berbangê, tu çawa ji ezmanan ve
ket! Tu ku, te gelan gêr dikir, tu
çawa wusa bi erdêve têk çû! 13 Û
te di dilê xwe de digot: Ez ê der-
kevim ezmanan, texta xwe bi ser
sitêrkên Xwedê ve bilind bikim û
di dawiyên bakûrê de, li çiyayê ci-
vakê rûnim; 14 ez ê derkevim cîhên

1 Ereb.

bilind yên ewran, ez ê xwe bikim
mîna Xwedayê mezin! 15 Lê belê
dê te daxin warê mirinê, herî kûri-
tiya kortikê! 16 Yên ku te bibînin,
dê zîq li te binêrin, dê bona te bifi-
kirin û bibêjin: Ma zilamê ku dinê
dilerizand, welatan kil dikir, 17 yê
ku rûyê erdê vedigerand çolê û ba-
jarên wê xera dikir, yê nedihişt ku
hêsîr herin mala xwe ev zilam bû?
18 Qiralên gelan, her yek li mala
xwe, gişt bi mezinahiyê radike-
vin. 19 Lê belê tu mîna guliyekî
mekrûh, ji qebra xwe derve, berbi
dûra ve hate avêtin, tu bi miriyan
ve hatiye nuxumandin, bi yên ku
gewdên wanî dadikeve kevirên
kortikê bi şûr ve hatine qûl kirinî;
tu mîna laşê ku di bin lingan de tête
cûtin î. 20 Tuyê bi nuxumandinê ve
bi wan re nikaribe yek bibe, ji ber
ku te welatê xerab kir, te netewa
xwe kuşt; dê nîjada yên ku xerabi-
yê kirine, abadîn neyê bi bîranîn.
21 Ji ber xayîntiya bapîrên wan,
cîhekî serjêkirinê ji bo lawên wî
amade bikin ku, bila ranebin ser
pêlan û warê ji xwe re nekin milk
û wecê dinê bi bajaran ve dane-
girin! 22 Û XUDANê artêşan
dibêje: Ez ê li dijî wan rabim û
nav û yê ku li ber mayîne û lawî
û zazî ez ê ji Babîlê jêkim û ba-
vêjim! XUDAN dibêje. 23 Û ez ê
wê ji jûjî re bikim milk û vegerî-
nim teqîna avê û ez ê wê bi hav-
lêka[1] helaqê bimalim! XUDANê
artêşan dibêje.

*Dê XUDAN Asûriyan biceza bike*

24 XUDANê artêşan sond xwar û
got: Rastî, ez çawa fikirîbim, dê
wusa bibe û çawa pêşnûma kiri-
bim, dê wusa bisekine! 25 Wusa
ku ez ê di welatê xwe de yê Asûrî
bişikînim û li ser çiyayên xwe, ez
ê wî di bin lingan de bicûm û dê
nîrê wî ji ser wan rabe û dê barê
wî ji ser wan rabe. 26 A vay, ter-
tîba ku bona hemûya dinê tête
pêşnûma kirin ev e û destê ku li
dijî hemûya gelan ve dirêj bûye ev
e. 27 Ji ber ku XUDANê artêşan
pêşnûma kir û kî dikare xera bike?
Û destê wî dirêj bûyiye û kî dika-
re wê şunda vegerîne?

*Dê XUDAN Filistiyan biceza bike*

2.Qir 18,8; Hêz 25,15-17

28 Ev bar, di sala ku qiral Ahaz çû
ser heqiya xwe de bû:
29 Ji serî heta serî, ya Filistîn ji
ber çoyê ku li te dixe şikestiye
kêfxweş nebe! Ji ber ku dê ji reha
mar, margîsk derkeve û dê bera
wê marê ku difire û dişewitîne
be. 30 Û dê pêşîbûyiyên xizanan
ji xwe re mêrgê bibînin û yên xi-
zan di ewlekariyê de rakevin û ez
ê koka te di xelayê de bikujim û
ji bermayiyên te dê werin kuştin.
31 Biûre ya derî! Feryadê bike ya

[1] Gêzik, malîş.

bajar! Ji serî heta serî, ya Filistîn,
tu huliya; ji ber ku ji bakurê duh tê
û di leşkerê wî de revok nîne.
32 Û dê çi bersiv ji şandiyê wî
gelî re bête dayîn? Dê were go-
tin ku, XUDAN bingeha Siyonê
daniye û dê zebûnê netewa wî bi
xwe, xwe li wir bisitirînin.

*Dê XUDAN Moabê biceza bike*

Hêz 25,8; Amos 2,1-3

15 Barê Moabê:
Ji ber ku bajarê Ar-Moab,
di şevekê de wêran û tune bû, ji
ber ku bajarê Kîr-Moab, di şevekê
de wêran û tune bû! 2 Bona ku bi-
girîn hilkişiyan Bayît û Dîbonê,
cîhên bilind; Moab bona Nebo û
bona Medeba fîxanê dike; porê
hemû seriyan hatin lîçikandin, her
rîh hate jêkirin. 3 Di kuçeyên wê
de cilikan li xwe dikin; li ser xani-
yên wê û di qadên wê de her kes
bi zêdeyî hêstiran dirijîne û fîxanê
dikin. 4 Û Heşbon û Elêalê ha-
warê dikin; dengên wan digihêje
ta Yahatsê; bo vê yekê, zilamên
Moabê yên bi çek bi dengên bi-
lind ve diqêrîn; canê wî di wî de
dilerize. 5 Dilê min bona Moabê
hawarê dike; revokên wî direvin
Tsoarê û Eglat-Şelîşiyê; ji ber ku
ji kaşê Lûhîtê bi girî hildikişin; ji
ber ku di rêya Horonayîmê de ha-
wara şikestî diqêrîn. 6 Ji ber ku dê
avên Nîmrîmê bibin çol, ji ber ku
gîha hişk bû, gîhayê teze qediya,
şênahî nîne! 7 Ji berya vêya dê zê-
deyiya di destên xwe de û tiştên
ku dane hev, ji ser geliya biyan
ve bikişînin û bibin. 8 Ji ber ku
hawar, dor sînorên Moabê girtin;
fîxana wî heta Eglaîmê û fîxana
wî gîhaşt Beer-Elîmê. 9 Ji ber ku
avên Dîmonê bi xwînê ve tijî bûn;
ji ber ku ez ê zêdeyiya wî bînim
ser Dîmonê, ez ê şêrekî bînim ser
revok û xelasbûyiyên Moabê û ji-
bermayiyên welêt.

16 Ji Selayê berxan bona ser-
werê welat, bi rêya çolê
ve bişînin çiyayê qîza Siyonê!
2 Ji ber, dê wusa bibe ku, civîkên
ku difirin her çawa bin, dê qîzên
Moabê jî di derbasokên Arnonê
de wusa bin. 3 Şîretê bide, dadi-
yê bike; di nîvê rojê de siya xwe
bike mîna şevê; sirgûnan veşêre;
revokan mede dest! 4 Bila sir-
gûnên min, tevî te rûnin; lê bona
Moabê jî, li dijî xerakir tu jî jê re
bibe cîhê sitargehê! Ji ber, yê ku
astengiyê dide tune bû, dawiya
têkçûnê tê, yên ku bi lingên xwe
ve dicûn, ji welat ve rabûn. 5 Û
dê text bi xêrê ve bête zexm kirin
û li ser wê di çadira Dawid de dê
serwerek bi rasteqînî wusa rûne
ku, dê li dadiyê bigere û di kirina
rastiyê de dê lez bike.
6 Me kubra Moabê, zehf bixirûrbû-
na wê, xirûr û kubra wê û xezeba
wê bihîst; pesnahiyên wan vala ne.

7 Ji ber vêya dê Moab fîxanê bike,
her kes fîxanê bikin; hûn ê bona
pîdeyên tirî yên Kîr-Haresetê bi
keserekî kûr şînê bigirin. 8 Ji ber
ku zeviyên Heşbon û mêwa Sîbma
hişk bûn; efendiyên gelan, mêwên
wê yên bijartî şikandin, ew mêwan
ku digihaştin Yazerê û çolê dadi-
girtin, ajên wê belav bûbûn, behrê
derbas kiribûn. 9 Ji ber vêya ez ê
bona mêwa Sîbma, bi giriyê Yazerê
bigirîm; ez ê te bi hêstirên çavên
xwe avdan bikim, ya Heşbon û
Eleale! Ji ber ku qêrîna cengê ket
ser mêwên te yên havînê û zadê
ku te çinandibûn. 10 Şahî ji zeviya
kêfxweş û berdar hate rakirin û dê
di rezan de ne sitirandin ne jî gale-
gala kêfxweşiyê hebe; dê di mahse-
reyan de yê ku xemrê çêke tune be;
qêrîna rez berdanê dam birrîn. 11 Ji
ber vê yekê, dilê min bona Moabê û
hundirê min bona Kîr-Heresê mîna
çenkekê dinale. 12 Û dê wusa bibe
ku, dema Moab xuyanî bibe, li ser
cîhê bilind xwe biwestîne, dema
bona duayê bikeve cîhê pîroz, dê ji
karekî re nebe!
13 Gotina ku di demên derbasbûyî
de XUDAN bona Moabê gotiye,
ev e. 14 Lê belê XUDAN niha
axifî û got: Tevî ajaweya xwe yî
mezin, mezinahiya Moabê, mîna
salên kesê bi heqdest, dê di nava
sê salî de vegere heqaretê û yê ku
ji ber mayiye dê ne mezin, zehf
biçûk be.

*Dê XUDAN Şamê biceza bike*

Amos 1,3-5; Yêr 49,23-27; 2.Qir 16,9

17 Barê Şamê:
A vay, Şam ji bajarbûnê hate
derxistin û dê bibe komekî wêrane.
2 Bajarên Aroerê hiştin; dê cîhên
keriyan hebin; ew ê li wê derê
mexel bibin û dê yê ku wan bêa-
ram bike tune be. 3 Û ji Efrayîmê
keleh û ji Şam û bermayiyê Sûriyê
dê qiraletî rabe, dê bibin mîna me-
zinahiya lawên Îsraêl! XUDANê
artêşan dibêje.
4 Û dê ew roj wusa bibe ku, me-
zintiya Aqûp kêm bibe û goştê wî
yê qelew dê lawaz bibe. 5 Û ger
oraqwan her çawa zad bide hev
û bi milê xwe her çawa similan
biçîne, dê wusa bibe, di çemê Re-
faîm de zilamek her çawa similan
bide hev, dê wusa bibe. 6 Lê belê
di wî de yê ku ji bermayîne dê
bên hiştin, mîna ku ji dar ve zey-
tûn bête xistin, dê li ser guliyê li
jor e du an sê heb û li serê guli-
yên darê çar an pênc heb hebin!
Xwedayê Îsraêlê XUDAN dibêje.
7 Ew roj dê mirov berê xwe bidin
yê ku wan afirandine û dê çavên
wan li Pîrozê Îsraêlê binêrin. 8 Û
dê berê xwe nedin pêşkêşîgehên
ku karên destên wan in û dê li
kirinên tilîkên xwe nenihêrin, ne
li Aşêran ne jî li pûtên rojê. 9 Dê
wê rojê bajarên wî yên bihêz bi-
bin mîna cîhên ku li daristanê û li
seriyên çiyan ji ber lawên Îsraêl

hatine berdan û dê bibin çol. 10 Ji ber ku te Xwedayê xwe yî xelasiyê ji bîr kir û te zinarê hêza xwe, di bîra xwe de neanî; ji ber vêya, tu şivên xweş diçikînî û darikên biyan diçikînî. 11 Roja ku te wan çikand tuyê çîtê bikişînî û sibehê tova wê bi çîçek dikî; lê belê di roja keser û xemgîniya ku dikuje de ber ji destê te ve difilite.

12 Ax galegala neteweyên ajawe! Mîna gurmîniya behran digurmin û xuşêniya gelan! Mîna xuşîniya avên xurt dê bixuşin! 13 Dê gelan, mîna xuşîniya pirr avan bixuşin; lê belê dê bi wan bipeke û ew ê birevin dûra û mîna kapekên kaya çiyayê ya ku li ber ba û mîna toza li ber bahozê digundire, dê bên qewirandin! 14 Dema êvarê, a vay, toqîn û berî ku bibe sibeh tune bûn! Para yên ku me talan dikin û hêsa yên ku diziya me kirine ev e.

*Dê XUDAN Hebeşê biceza bike*

18 Ax, welatê vizîna baskan, yê ku ji çemên welatê Hebeşê[1] wêde yî! 2 Ew welat ku, ji behran û ji ser wecê avan, bi lotkeyên ji qamiran şandiyan dişîne! Peyakên lingên wan bilez in, herin gelê çermên wan dibiriqe û qamdirêj in, ên ku welatên wan bi avan ve hatiye parî bûn, netewa ku ji roja bûyîna xwe ve tirsehêz in, gelê pirr xwurt e û di bin lingên xwe de dicûn. 3 Hûn giştî, yên ku li dinê rûdinin û şêniyên rûyê erdê, dema al li ser çiyayan bête çikandin bibînin û dema borî bête lêxistin bibihîzin!

4 Ji ber ku XUDAN, ji min re wusa got: Ez ê mîna di tîrêjên rojê de germiya zelal, di germiya dema oraqê de mîna ewrê xunavê bêdeng bibim û ji şunwara xwe ve binêrim. 5 Ji ber ku, berî wexta rez berdanê, paşî derbasbûna çîçekbûnê û dema çîçek bibe hersima ku dibe, dê bi kêrên rezvanan şivan jê bike û çovikan biqetîne û bavêje. 6 Dê giştik pev re ji teyrên hov yên çiyê re û ji heywanên hov yên erdê re bên berdan û dê teyrên hov li ser wan havînê derbas bikin û dê hemû heywanên hov li ser wan zivistanê derbas bikin. 7 Wê gavê dê ji XUDANê artêşan re, ji gelê ku çermên wan dibiriqe û qamdirêj in, ên ku welatên wan bi avan ve hatiye parî bûn, netewa ku ji roja bûyîna xwe ve tirsehêz in, gelê pirr xwurt e û di bin lingên xwe de dicûn ve, dê ji cîhê navê XUDANê artêşan, ji Çiyayê Siyonê re xelat bête anîn.

*Dê XUDAN Misirê biceza bike*

Yêr 46; Hêz 29-32

19 Barê Misirê:
A vay, XUDAN li ewra bi lezî diçe siwar bûye û diçe Misirê û dê pûtên Misirê ji bo wê bileri-

1 Kûş.

zin û dilê Misirê di hundirê xwe de
buhule. 2 Û ez ê Misiriyan li dijî
Misiriyan rakim û dê her kes li dijî
birayê xwe û her kes li dijî cîranê
xwe, bajar li dijî bajêr û dê welat li
dijî welatî cengê bikin. 3 Û dê ruhê
Misirê tê de nemîne û ez ê şîreta wê
xera bikim û dê bi pûtan, bi sêrba-
zan û bi cinvanan û bi nêrînvanan
ve bişêwirin. 4 Û ez ê Misiriyan bi-
dim destê efendiyekî tund û dê qi-
ralekî dilhişk ji wan re bibe serwer,
Xudanê artêşan XUDAN dibêje.
5 Û dê av ji behrê ve kêm bibin
û çem dê vekişe û ziwa bibe. 6 Û
dê çem gemar bibin û qenalên Mi-
sirê vala û hişk bibin; dê qamir û
leven biçilmisin. 7 Mêrgên ku li
cem qeraxa Nîlê, li cem Nîlê ne û
hemû zeviyên Nîlê, yên ku hatine
çandin dê hişk bibin, bibin toz û
belav bibin. 8 Û dê masîvan ax û
waxê bikin û hemûyên ku şewkê
davêjin Nîlê, dê şînê bikişînin û
yên ku torên xwe li ser rûyê Nîlê
vedikin dê bi xwe bikevin. 9 Û
yên ku kitanê şehikandî dirêsînin
û cawên sipî dirêsînin, dê bikevin
şermezariyê. 10 Û dê sitûnên wê
perçe bibin; dê canê hemû kar-
kerên ku bi heqdestiyê dixebitin bi
xemê bikevin.
11 Serokên Tsoanê bitûmî bitûmî
zebûnên kêf û şahiyê ne; şîreta
şîretkirên Fîrawûn ên zaniyar
in, bi ehmeqî bû; ma hûn çawa
ji Fîrawûn re dikarin bibêjin: Ez
lawê zaniyara me, ez lawê qiralên
demên kevn im? 12 Kanê zilamên
te yên bi zanîn li ku ne? Û niha
bila bigihînin te û bila bizanibin ku
pêşniyara XUDANê artêşan, bona
Misirê çî ye! 13 Serokên Tsoanê
bûn zebûnê kêfê, serokên Memfîsê
xapiyan; yên ku kevirên serekê ên
nifşeyên Misirê ne, wê rêşaş kirin.
14 XUDAN bona wê, ruhê şewşiyê
tevlê kir û çawa ku serxweş di hun-
dirê verşiya xwe de here du alî, Mi-
sirê jî di her karê wê de wusa şewş
kirin. 15 Û li Misirê dê tu karê ku
serî an jî terrî, guliyê xurmê an jî
qamir çêbike nemîne.
16 Dê ew roj, Misirî bibin mîna
pîrekê û dê ji kilbûna destê XU-
DANê artêşan ê ku bi ser wan ve kil
dike bilerizin û bêzar bibin. 17 Û
dê warê Cihûda, bona Misirê bibe
toqînek û her zilamê ku navê wê di
wan de bête bîranîn; ji ber nêta ku
li dijî XUDANê artêşan aniye, dê
bêzar bibe.
18 Dê ew roj, li warê Misirê pênc
bajarê ku bi zimanê Kenanê ve
diaxife û ji XUDANê artêşan re
sondê xwarine hebin; dê ji yekê
re, bajarê têkçûnê[1] bête gotin.
19 Dê ew roj, li nava warê Misirê
ji XUDAN re pêşkêşîgehek û li
cem sînorê wê ji XUDAN re dê
kevirekî çikyayî hebe. 20 Û dê ji
XUDANê artêşan re, li warê Mi-

[1] Îr-Heres; an jî:Roj.

sirê bona nîşan û şahdeyiyê hebe;
ji ber, bela yên ku tengasiyê didin[1]
dê ji XUDAN re hawarê bikin û
dê ji wan re xelaskerek û paraz-
kerekî bişîne û dê ew, wan azad
bike. 21 Û dê XUDAN xwe agahî
Misirê bike û ew roj dê Misirî bi
XUDAN ve bizanibin û bi qurban
û pêşkêşiyê ve peristinê bikin û
dê dehiyan ji XUDAN re qewil
bikin û berdêla wê bidin. 22 Û dê
XUDAN li Misirê bixe û dê lêxe
û qenc bike û dê vegerin XUDAN
û lavayên wan dê bên qebûl kirin
û dê wan qenc bike.
23 Ew roj, dê ji Misirê heta Asûrê
rêya mezin hebe û dê Asûrî were
Misirê û Misirî werin Asûrê û Mi-
sirî tevî Asûriyan peristinê bikin.
24 Dê ew roj Îsraêl ji Misir û
Asûrê re sêwemîn, di nava dinê
de bibe bereket; 25 ji ber ku XU-
DANê artêşan bi gotina: Bila ne-
tewa min Misir û karê destê min
Asûr û mêrasa min Îsraêl pîroz
bibin! wan pîroz danî.

*Yên ku hatine serê Hebeş û Misirê*

20 Sala ku Tartan hate Aşdodê,
dema qiralê Asûrê Sargon
wî şand û wî li hember Aşdodê
cengê kir û wê stend. 2 Wê gavê,
XUDAN bi navdîtiya Îşayayê lawê
Amots axifîbû û gotibû: Here, ci-
likê li pişta te yî veke û çaroxa xwe
ji lingê xwe ve derxîne! Û wusa
kir û tazî û pêxas meşiya. 3 Û XU-
DAN got: Çawa ku qûlê min Îşaya,
bona ku ji Misirê û ji bajarê Hebeşê
re bibe nîşan û wekok sê sal tazî û
pêxas meşiya be; 4 qiralê Asûrê jî,
bona ku ji Misirê re bibe şermezarî,
dê hêsîrên Misirê û sirgûnên
Hebeşê, xortan û mêrên kalepîr, bi
vî awayî tazî û cîhên wanî rûniştinê
vekirî bajo. 5 Û ji berya welatê
Hebeşê ku pê ewle bûn û ji berya
Misira ku pê pesnahiyê didan, dê
şaş bimînin û şermezar bibin. 6 Û
zilamê ku li welatê qeraxa behrê
rûdine, dê ew roj bibêje: A vay, yê
ku em bona ji qiralê Asûrê birevin
û alîkariyê jê bibînin reviyan û pê
sitirîn wusa bû! Ma ka em ê çawa
birevin û xelas bibin?

*Peyxamberiya di derheqê Babîlê de*

Îşa 13-14; Yêr 50-51; Dan 5

21 Barê çola behrê:
Li başûrê bahoz çawa dij-
war êrîş bikin, ji çolê, ji warê
tirsehêz ew jî wusa tê! 2 Xewn
û xeyalekî dijwar ji min re hate
têgîhandin; xayîn xayîntiyê dike
û xerakir jî xerakiriyê dike. Ya
Elam, derkeve! Ya Medya wê
bipêçe! Min dawiya hemû nalînên
te anî. 3 Ji ber vêya jan bi pişta
min ve zeliqî; mîna êşên pîreka
ku min aniye dinê êş bi min ve
girt; ez ewqasî êşê dikişînim ku
ez nabihîzim; ez ewqasî ditirsim

[1] An jî: Ji ber rûyên yên ku tengasiyê didin.

ku, çavê min nabîne. 4 Dilê min
mat mayî bû, toqîn min bêzar kir;
tariya belek ya ku jê hez dikim,
bona min bû ricifandin.
5 Sifrê amade dikin; xalîçeyan ra-
dixin, dixwin û vedixwin, rabin ya
serokno, rûn di mertalê de bidin!
6 Ji ber ku Xudan wusa got: Here,
notirvanekî deyne, bila tiştên ku
bibîne, bigehîne 7 û gava lîqek,
cot bi cot hespî, lîqek ker û lîqek
deve bibîne, bila bi balkêşî guh-
darî bike! 8 Û mîna şêrekî bang
kir: Ya Xudan, ez her tim rojê li
ser qûleyê sekinîme û hemû şevan
di nobedariya xwe de sekinîme!
9 Û a vay, lîqek mirov, cot û cot
hespî tên! Û bersivê da û got:
Xera bû, Babîl xera bû û hemû
pûtên îlahên wan li erdê ve hate
lêxistin û hatin perçe kirin!
10 Ya genimê minî hatiye kutan-
din û lawê bêndera min! Tiştên
ku min ji Xwedayê Îsraêlê XU-
DANê artêşan ve bihîstiye, ji we
re têgîhandim.

*Peyxamberiya di derheqê Edom û Erebîstanê de*

Yêr 49,7-22.28-33; Oba 1

11 Barê warê Dûmayê:
Yek ji Seîrê ve bang min dike:
Notirvan, ji şevê ve çi heye?
12 Notirvan got: Sibeh tê, şev jî
tê, ger hûn dixwazin pirsê bikin,
bipirsin! şunda vegerin û werin!
13 Barê ku li ser bajarê Ereb:
Ya karwanên Dedaniyan, hûn
ê li daristana bajarê Ereban
şevbuhurtiyê bikin! 14 Ji yê ku
tîbûne re avê bînin! Yên ku li warê
Temayê rûdinin, bi nan pêşwaziyê
ji revokan re bikin! 15 Ji ber ku ji
ber şûran, ji ber şûrê tazî û ji ber
kevana ku hatiye kişandin û ji
ber giraniya cengê reviyan. 16 Ji
ber ku Xudan ji min re wusa got:
Hemû mezinahiya Kedarê, mîna
salên kesê bi heqdestiyê dixebite,
dê di nava salekî de biqede 17 û
yên ku ji ber hejmara tîrvanan ve
mayiye; egîdên lawên Kedarê dê
hindik bibin! Ji ber ku Xwedayê
Îsraêlê XUDAN got.

*Peyxamberiya di derheqê Orşelîmê de*

22 Barê geliya xewn û xeyalê:
Ya bajar, bajarê ku bi qêrîn-
an ve tijî, bi galegal, bi şahî, ma
niha ji te re çi bû ku hûn gişt pev re
derketin ser xaniyan? 2 Yên te, yên
ku mirine, bi şûr ve nehatin kuştin
û di cengê de nemirîn! 3 Hemû
serwerên te pev re reviyan, ji aliyê
tîrvanan ve hatin girêdan; yên ku
ji te ve ketine dest, gişt pev re ha-
tin girêdan, ew ku reviyabûn dûra.
4 Ji ber vêya gotim: Çavên xwe ji
min ve bizivirînin, ez bi êş û jan bi-
girîm; ji berya ku qîza netewa min
hatiye şêlandin, xemrevîniyê ji min
re nekin!
5 Ji ber ku ji aliyê Xudanê artêşan
XUDAN ve, li geliya xewn û xe-

yalê, roja galegal û cûtin û şaşitî,
xerabûna dîwaran û ji çiyayan re
hawar kirinê ye. 6 Û Elam, tevî
erebeyên cengê yên ku bi zilaman
ve tijî ne û tevî siwaran sedeqa xwe
li pişta xwe xist û rûberê mertala
Kîrê derxist. 7 Û wusa bû ku, hemû
geliyên te yî herî xweş bi erebeyên
cengê ve hatin dagirtin û siwarî li
hember derî rêz bûn. 8 Û rûberkê
Cihûda rakirin; te jî ew roj li çekên
mala daristanê nihêrt. 9 Û we der-
zên bajarê Dawid dîtin, ew zehf
bûn û we avên burka jêrîn dan hev
10 û we malên Orşelîmê jimartin û
bona zeximandina dîwar we xani-
yan xera kirin 11 û we bona avên
burka kevin di nava du dîwarî de
xezna avê çêkirin. Lê belê we li yê
ku van karan kirine nenihêrtin û yê
ku ji zû ve pêşniyariya vêya kiriye
nehesibandin.
12 Û Xudanê artêşan XUDAN,
ew roj bona giriyê û li xwe xistinê
û por lîçikandinê û cilik li xwe ki-
rinê bang kir 13 û a vay, kêfxweşî
û şahî, ganêran serjêkirin û mîhan
jêkirin, goşt xwarin û xemr ve-
xwarin hebûn, we digotin: Em
vexwin û bixwin, ji ber ku em ê
sibê bimirin! 14 A vay, XUDANê
artêşan bi guhên min ve da bihîs-
tin: Bi rastî, heta ku hûn bimirin,
dê ev xerabî ji we re neyê borîn!
Xudanê artêşan XUDAN dibêje.
15 Xudanê artêşan XUDAN
wusa dibêje: Here! têkeve cem wî
keyayî, Şebnayê ku li ser mala qiral
e û jê re bibêje: 16 Ma li vir çi karê
te heye? Û li vir kî yê te heye ku,
te ji xwe re li vê derê qebrê kola?
Li cîhê bilind qebra xwe kola, di
zinarê de ji xwe re şunwarê kola.
17 A vay, ya kesê dijwar, dê XU-
DAN te bi avêtinekî dijwar bavêje
û te bike gilokek şidandî! 18 Bi
rastî, dê te bizivirîne bizivirîne û
mîna topekî bavêje warekî fireh;
tuyê li wir bimire û dê erebeyên te
yî serweriyê li wir bibin, ya tu, zi-
lamê ku li mala efendiyê xwe bûye
şermî! 19 Û ez ê te ji karmendiya te
biqewirînim û ji cîhê ku tu sekini-
ye ez ê te bavêjim jêr. 20 Û dê ew
roja wusa bibe ku, ez ê bangî qûlê
xwe Elyakîmê lawê Hîlkiya bikim
21 û ez ê cubba te li wî bikim û ez
ê bi şûtika te wî xwurt bikim û ez ê
destrayedariya te bidim destên wî
û dê ji yên ku li Orşelîmê rûdinin
re û ji mala Cihûda re bibe bav.
22 Û ez ê kilîta mala Dawid dey-
nim ser milê wî û ew ê veke û dê tu
kes nikaribe bigire û ew ê bigire û
dê tu kes nikaribe veke. 23 Û ez ê
wî li derekî ewle mîna sîxekî biku-
tim û dê bona mala bavê xwe bibe
kursiya bilindahiyê. 24 Û dê hemû
mezinahiya mala bavê wî, ajên xwe
yî rehê û ajikên xwe yî berê aliyê, ji
tasan heta ceran[1] dê hemû feraxan
li ser wî ve daliqînin.

1 Şerbikan.

25 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Dê sîxê ku li cîhê ewle hatiye ku-
tandin, ew roja ji cîhê xwe ve der-
keve û jê bibe û bikeve û dê barê
ku li ser wî yî bê jêkirin û avêtin;
ji ber ku XUDAN got.

*Peyxamberiya di derheqê Bajarê Sûrê de*

Yêr 25,22; Hêz 26-28; Amos 1,9-10;
Zek 9,2-4

23 Barê Sûrê:
Ya keştiyên Tarşîşê,
biûrin! Ji ber ku ew wêran bû,
xanî nîne, cîhekî ketinê nîne! Ji
warê Kîttîmê ve ji wan re hate
gihandin. 2 Ya yên ku li qeraxa
giravê rûniştine, hiş bin! Bazir-
ganê Sayda, yê ku ji behrê ve der-
bas dibû te dagirt. 3 Û li ser avên
mezin hatina wî zexîra Şîhor,
berê Nîlê yê ku bi şirîkantiye bû
û cîhê ku netewe li wir danûsten-
dinê dikirin ew der bû. 4 Ya Say-
da, bişerme! ji ber ku behr, keleha
behrê ya xwurt axifî û got: Ez bi
xwe janê nekişandim û zayinê
nekirim û egîdên bijartî xwedî
nekirim û keçan mezin nekirim. 5
Dema agahî bigihêje Misirê, dê ji
agahiya Sûrê zehf êşê bikişînin. 6
Derbasî Tarşîşê bibin; ya yên ku
li qeraxa giravê rûniştine, biûrin!
7 Ma ew bajarê we yî bi şahî ev
e? Ew bajarê ku kevnbûna wê ji
rojên kevn e; lingên wî, bona ku li
biyaniyê bimîne wî birin dûr ve.
8 Ma kî li dijî Sûra ku tacan dide
seriyan pêşniyariya vî karî kir?
Ew bajarê ku bazirganên wê serok
bûn, bazirganên wê zilamên ku li
dinê birûmet in bûn. 9 Bona ku
xirûra her mezinahiyê xera bikin,
hemû mirovên ku li dinê birûmet
in bixînin heqaretê, XUDANê
artêşan pêşniyariya vî karî kir.
10 Mîna warê xwe Nîlê derbas
bibe, ya keça Tarşîşê! êdî yê ku bi
zorê pê digire nîne. 11 Destê xwe
bi ser behrê ve dirêj kir, welatan
lerizandin; bona ku kelehên
Kenanê xera bikin, XUDAN di
derheqê wî de emir da. 12 Û wî got:
Êdî tuyê tu carî bi şahiyê necoşe,
ya qîza ku hatiye gemarî kirin,
qîza Sayda ya ku hîn nezewiciye!
Rabe, derbasî Kîttîmê bibe! Heta
li wir jî ji te re aramî nîne.
13 A vay, welatê Kildaniyan! Ew
netewe êdî nîne; Asûr wê ji hey-
wanên çolê yên hov re berda; wan
qûleyên xwe daçikandin; qesrên
wê xera kirin; wê wêrane kirin.
14 Û biûrin ya keştiyê Tarşîşê! ji
ber ku birca we xera bû. 15 Û dê
wê rojê wusa bibe ku, heftê sal,
mîna rojên qiralekî, dê Sûr were
ji bîr kirin; dema heftê sal biqede,
fahşê di kilama xwe de çawa be,
dê ji Sûrê re jî wusa bibe. 16 Çen-
kekê rahêle, li bajêr bigere, ya tu,
fahşa hatiye ji bîr kirin! bona ku
te di bîra xwe de bînin qenc lêxe,
pirr sitranan bibêje! 17 Û dema

heftê sal biqede, dê wusa bibe ku
dê XUDAN sehêtiyê li Sûrê bike
û dê bajêr bizivire heqê fahşetiyê
û dê bi hemû qiraletiyên dinê, yên
ku li rûyê erdê ne re fahşetiyê bike.
18 Û kara wê û heqê fahşetiyê, dê
ji XUDAN re pîroz bibe; dê neyê
xistinî xezînê û neyê veşartin; ji
ber, bona heta ku têr bibin bixwin
û kincên qenc li xwe bikin, dê qe-
zenca wê ji yên ku li ber XUDAN
rûdinin re bibe.

*Dê XUDAN Dinê biceza bike*

24 A vay, XUDAN dinê vala
dike û wê dike çol û wecê
wê bi ser û binî dike û yên ku li
wir rûdinin belav dike. 2 Û dê
wusa bibe ku, netewe çawa be,
dê kahîn jî wusa; dîl çawa be, dê
efendî jî wusa; cariye çawa be, dê
xanima wê jî wusa; yê ku distîne
çawa be, dê yê ku difroşe jî wusa;
yê deyndarbûyî çawa be, deyndar
jî wusa; yê ku selefê distîne çawa
be, dê yê ku selefê dide jî wusa
be. 3 Dê dinya ji serî heta serî vala
bibe û ji serî heta serî bête talan
kirin; ji ber ku XUDAN vê gotina
got. 4 Dinya şînê digire û wecê
wê diçilmise, erd lawaz dibe û
wecê wê diçilmise, neteweyên
bilind yên dinê lawaz dibin. 5 Û
dinya, di bin yên ku li ser rûniştine
de gemarî bû; ji ber ku, ji zagonên
xwe wê de çûn, zagonan avêtin
bin lingan, peymana abadîn xera
kirin. 6 Lanet ji ber vêya dinê
xwar û qedand û yên ku li wir
rûniştine sûcdar derketin; yên ku
li dinê rûdinin ji ber vêya şewitîn
û mirovê ku ji ber mayîne kêm in.
7 Xemra nû şînê dikişîne, mêw la-
waz dibe, hemûyên ku dilên wan
kêfxweş in dinalin. 8 Coşîna tefan
qut bû, galegala yên ku şahiyê di-
kin qediya, coşîna çengê qut bû.
9 Dê tevî kilaman nikaribin xem-
rê vexwin; dê xemr vexwarin ji
kesên ku vedixwin re tahl bibe.
10 Bajarê tenha xera bû; bona ku
tu kes nekevê her xanî hate girtin.
11 Bona xemrê li kuçeyan qêrîn
hene; her kêfxweşî tarî bû, coşîna
warê sirgûn bû. 12 Li bajêr wêra-
netî ma û derî bi lêxistinan ve xera
bû. 13 Ji ber, bona xistina zeytûnê
dema li darê bixin çawa be, dema
rez xerakirinê tiriyên ji ber mayî-
ne çawa bin, dê di nava dinê de
netewe jî wusa bin.
14 Dê vana dengê xwe bilind
bikin û bistirên; ji ber mezinahi-
ya XUDAN dê bi dengê bilind
ji behrê ve bang bikin: 15 Bo vê
yekê li rojhilatê ji bilindahiyê bi-
din XUDAN, di giravên behrê de
mezinahiyê bidin navê Xwedayê
Îsraêlê XUDAN! 16 Em ji dawi-
yên dinê ve qesîdeyan dibihîzin:
Mezinahî ji yê salih re!
Lê belê gotim: Qediyam, qedi-
yam, wey li serê min! Belê, xayîn-
an zehf xayîntiyê kirin. 17 Ya tu,

zilamê ku li dinê rûdine, toqîn û
kortik û dafik li ser te! 18 Û dê
wusa bibe, yê ku ji welwela toqînê
bireve, dê bikeve kortikê û yê ku ji
kortikê derkeve, dê bikeve dafikê;
ji ber ku şivakên li jor in vebûn û
bingehên dinê dilerizin. 19 Dinya
her ku eciqî eciqî, dinya her ku
qelişî qelişî, dinya her ku lerizî,
lerizî. 20 Dê dinya mîna zilamekî
serxweş tilpekî bibe û mîna hêlan-
ekekê dê kil bibe û dê gunehê wê
bi ser ve giraniyê bike û dê bikeve
û carekî din ranebe.
21 Û dê ew roj, wusa bibe ku dê XU-
DAN sehêtiya yên ku li bilindahiyê
ne, li bilindahiyê û sehêtiya qiralên
erdê jî li erdê li ser erdê bike. 22 Û
dîl çawa di kortikê de bicivin, dê
ew jî li cem hev bicivin û dê bêne
avêtinî girtîgehê û paşî pirr rojan
dê werin sehêtî kirin. 23 Û dê heyv
sor bibe û roj bişerme; ji ber ku dê
XUDANê artêşan li Çiyayê Siyonê
û li Orşelîmê qiraletiyê bike; li ber
kalepîrên wî jî mezinahî ye!

*Qesîda Pesnahiyê*
Zeb 9

25 Ya XUDAN, Xwedayê
min tu yî; ez te bilind di-
kim, bi navê te hemdê dikim; ji ber
ku te karên ku didin şaşkirinê kir,
nêtên ku ji berê ve hatine danîn,
dilsozî û rasteqînî! 2 Ji ber ku te ji
bajêr ve komekî kevir; ji bajarê bi
dîwar wêraneyekê çêkir, te qesra
biyanan ji bajariyê ve derxist; dê
abadîn neyê çêkirin[1]. 3 Ji ber vêya,
dê neteweyek xwurt mezinahiyê
bide te; dê bajarên gelên tirsehêz
ji te bitirsin. 4 Ji ber ku dema hil-
ma mirovên tirsehêz, bibe mîna
rêjneya ku li dîwar dikeve, tu ji xi-
zan re bû birc, ji xizanê ku di nava
tengasiya xwe de ye re birc, li dijî
rêjneyê sitargeh û li dijî germiyê
bû sîgeh. 5 Mîna ku germî li cîhê
ziwa kiriye, tuyê welwela biyani-
yan nizm bike; mîna ku germî bi
siya ewrê kêm dibe, dê murxê zi-
lamên tirsehêz kêm bibe.

*Şahiya ku XUDAN amade kiriye*

6 Û li vê çiyê, dê XUDANê
artêşan, ji tiştên qelew ziyafetekî,
ji xemrê kevin, ji tiştên qelew ên
ku bi rûn ve tijî, ji xemrên kevin
ên ku hatine parzinandin ziya-
fetekî bide hemû netewan. 7 Dê
rûyê rûbera ku hemû netewan nu-
xumandiye, perda ku bi ser hemû
gelan ve hatiye kişandin li vî çi-
yayî tune bike. 8 Abadîn mirinê
daqurtand û Xudan, XUDAN,
dê ji hemû wecan hêstirên çavan
paqij bike û dê ji ser hemû dinê
şerma netewa xwe rake; ji ber ku
XUDAN got.
9 Û dê ew roj were gotin: A vay,
Xwedayê me ev e; em li benda wî
man û dê me xelas bike; XUDAN

[1] Ava kirin.

ev e; em li benda wî bûn! Em ê
bi xelas kirina wî bi kêfê bikevin
û kêfxweş bibin! 10 Ji ber ku dê
destê XUDAN li vî çiyayî ara-
miyê bibîne û di ava koma sergo
de ka çawa bê cûtin; dê Moab jî
li cîhê xwe were cûtin. 11 Û ev
zilamê ku avjêniyê dike, çawa
ku bona avjêniyê destê xwe dirêj
dike, dê di nava wê de destê xwe
dirêj bike; lê belê dê XUDAN
xirûra wî, tevî hunerê destê wî ve
nizm bike. 12 Û bircên bilind yê
dîwarên te dê xera bike, nizm bike
û daxîne heta tozê û heta axê.

*Qesîdeya Kêfxweşiyê*

26 Ew roj, dê li warê Cihûda
ev qesîde were sitirandin:
Bajarê me yî xwurt heye; xelasi-
yê bi dîwar û bircbûnê ve datîne.
2 Deriyan vekin, bila gelê salihê
ku dilsoziyê diparêze bikevin
hundir! 3 Tu yê ku dilê wî nale-
rize, di nava xweşiyê de vedişêrî;
ji ber ku ew bi te ewle dibe.
4 Abadîn bi XUDAN ve ewle
bibin; ji ber ku di XUDAN, XU-
DAN de zinarê abadîn heye. 5 Ji
ber, yên ku li bilindahiyê rûdinin,
bajarê bilind şikenandin; wê nizm
kir, heta erdê nizm kir; heta axê
daxist. 6 Di bin lingan de, di bin
lingên zebûnan de û di bin gavên
xizanan de dê were cûtin. 7 Rêya
yê salih rastî ye; tu ku rast î, tuyê
rêya salih rast bike.
8 Rastî, ya XUDAN em di rêya
daraziyên te de li benda te bûn;
xwestina canê me ji navê te û ji
navê bîranîna te ye. 9 Şevê bi canê
xwe te xwestim; belê, sibehê ez
bi ruhê xwe te di hundirê xwe de
digerim; ji ber heta ku daraziyên
te li rûyê erdê bin, yên ku li dinê
rûdinin fêrî rastiyê dibin. 10 Bila
ji yê xerab re xêr bête kirin, dîsa
fêrî rastiyê nabe, li warê rastiyê
neheqiyê dike û mezinahiya XU-
DAN nabîne.
11 Ya XUDAN, destê te bilind bû,
lê belê ew nabînin, lê belê dê xîre-
ta te ya ku bona netewê bibînin û
bişermin; belê, dê agir neyarên te
bixwe û biqedîne. 12 Ya XUDAN,
tuyê selametê bidî me; ji ber ku
hemû karên me jî te serfiraz kir.
13 Ya XUDAN Xwedayê me, xey-
nî te efendiyan jî efendîtî ji me re
kirin; lê belê em ê tenê navê te bi
te re di bîra xwe de bînin! 14 Ew
mirî ne, navejin; sî ne, ranabin;
ji ber vêya te sehêtiyê li wan kir
û helaq kir, te di bîranîna wan jî
bitûmî bitûmî tune kir. 15 Te gel
zêde kir, ya XUDAN, te gel zêde
kir; te mezinahî dît; hemû sînorên
welêt fireh kir.
16 Ya XUDAN, di tengasiyê de
li te geriyan; dema perwerda te
gîhaşt wan, lavayên wan rijan-
din. 17 Pîreka ducanî ya ku nêzîkî
dema zayînê bûye, çawa ku êşê
dikişîne û di êşên xwe de diqêre,

ya XUDAN, em jî li ber te wusa
bûn. 18 Em ducanî bûn, êşan
kişandin, wekî ku em ba bizên;
li dinê me xelasiyê nekirin û yên
ku li dinê rûdinin neketin. 19 Dê
miriyên te bivejin; dê cesedên yên
min rabin! Ya hûn, yên ku di hun-
dirê axê de radikevin, hişyar bin û
bistirên! Ji ber ku xunava te mîna
xunava gîhayê yî û dê erd miriyan
bavêje derve.
20 Were, ya netewa min, bikeve
odeyên xwe yî hundirîn û li pêy
xwe deriyan bigire; heta ku xezeb
derbas bibe hinekî xwe veşêre!
21 Ji ber ku a vay, ji ber xerabiyên
wan, bona ku XUDAN yên ku li
dinê rûdinin biceza bike, ji cîhê
xwe derdikeve û dê dinya xwîna
xwe deyne cîhê vekirî û dê êdî
yên ku hatine kuştin nexumîne.

*Xelasiya Îsraêlê*

27 Dê ew roj, XUDAN
bi şûrê xwe yî mezin û
dijwar, sehêtiyê li Levyatan, li
ew marê ku bi lezî direve û li
Levyatan, li ew marê ku çîv diçe
bike û cenawirê ku di behrê de ye,
dê bukuje.
2 Dê ew roj bête gotin: Rezê xem-
rê! Jê re bistirên! 3 Ez XUDAN,
parazkirê wê me; ez ê her deqîqe
avdana wê bikim; bona ku tu kes
sehêtiyê lê neke, ez ê bi şev û
roj wê biparêzim. 4 Bi min re xe-
yidandin nîne; xwezîka kelem û
qirş di cengê de li dijî min bibûna!
Ez ê li hember wan bimeşiyama,
wan giştikan pev re bişewitan-
dima. 5 An jî bila bi hêza min bi-
zeliqe û bi min re aştiyê bike, belê,
bila bi min re aştiyê bike. 6 Dê di
rojên ku werin de, Aqûp rehê
berde; dê Îsraêl gonce bide û
biçîçeg bibe û dê rûyê erdê bi
mêwan ve dagirin.
7 Ma çawa li yên ku li wî xistine
xistibe, wusa li wan jî xistin? An jî
yên ku ji aliyê wî ve hatine kuştin
çawa hatibin kuştin, ma wusa hatin
kuştin? 8 Dema tu wan biqewirînî,
tu bi pîvanê li dijî wan dozê vedi-
kî; di roja bayê rojhilatê de, bi bayê
xwe yî tund wan malt û avêt. 9 Ji
berya vêya dê gunehê Aqûp bi vêya
ve bête nuxumandin û hemû bera
rakirina sûcê wî ev e ku, dê hemû
kevirên pêşkêşîgehê bikin mîna
kevirên gêçê ên ku hatine kutan;
dê Aşêr û pûtên rojê êdî neyên çi-
kandin. 10 Ji ber ku bajarê bi dîwar
bi tena serê xwe, mîna çolekê hati-
ye berdan û bûye welatekî bêkes;
dê li wir golik biçêre û li wir ra-
keve û şivên wê bixwe û biqedîne.
11 Û dema guliyên wê hişk bibin,
dê werin jêkirin; dê pîrek werin û
wan bişewitînin; ji ber ku vana ne-
teweyên ku fêhmkariyên wan tune
ne; ji ber vêya yê ku wan afirandi-
ye, dê heyfa xwe li wan neyne û yê
ku şikil daye wan, dê xêrê bi wan
re neke.

12 Û dê ew roj wusa bibe ku,
XUDAN dê ji lehiya çemê Fe-
ratê heta geliyê Misirê, li berê
wê bixe û bixîne û hûn, ya lawên
Îsraêl, hûn ê yek û yek werin
berhev kirin.
13 Û dê ew roj wusa bibe ku, li
boriya mezin bête xistin û yên ku
li warê Asûrê di ber helaq kirinê
de ne û sirgûnên ku li warê Misirê
ne, dê werin û li çiyayê pîroz, li
Orşelîmê dê peristinê ji XUDAN
re bikin.

*Îkazên ji Efrayîm re*

28 Çi heyf li taca xirûrê ya serxweşên Efrayîmê û li
çîçega xweşikiya diçilmise, ya ku
zilamên bi xemrê ve hatine lêxis-
tin, li serê çemê ku axa wê ya
berdar heye re pesnahiyê didan!
2 A vay, zilamekî XUDAN yê
dijwar û xwurtî heye, mîna baho-
za zîpikan mîna bahoza ku xera
dike, mîna bahoza avên mezin
ên lehiyê, bi dijwarî li erdê dixe.
3 Dê taca serxweşên Efrayîm,
ya xirûrê, di bin lingan de bête
cûtin 4 û dê çîçega xweşikiya ku
diçilmise, ya li serê çemê ku axa
wê ya berdar pesnê wê didan, dê
bibe mîna hêjîra pêşîn ya ku berî
havînê digihêje; yê ku binêre, wê
dibîne, dema bikeve destê wî, dê
hema daqurtîne. 5 Dê ew roj, XU-
DANê artêşan, ji bermayiyên ne-
tewa xwe re bibe taca bilindahiyê
û çelenga xweşikiyê 6 û dê bona
yê ku di kursiya daraziyê de rûdi-
ne bibe ruhê dadiyê û bona yê ku
cengê ji ber derî ve diqewirînin
bibe hêz.
7 Û vana jî ji xemrê tilpekî dibin
û ji araqê dilerizin; kahîn û pey-
xamber ji araqê tilpekî dibin, ze-
bûnê xemrê ne; di xewn û xeyalê
de çewt dibin, di daraziyê de til-
pekî dibin. 8 Ji ber ku hemû sifre
bi verşî û pîsitiyê ve tijî ne, cîhê
paqij nîne.
9 Ma dê zanînê hînî kî bike? Û ji
kê re agahiyan bibêjî? Ma dê ji
yên ku ji şîr ve hatine birrîn û yên
ku ji pêsîrê ve qut bûne re? 10 Ji
ber ku emir li ser emrê, emir li ser
emrê, zagon li ser zagonê, zagon
li ser zagonê; hinek li vir, hinek
li wir[1]!
11 Belê, dê ew tenê bi lêvên biyan
û bi zimanekî din ji vê netewê re
bibêje; 12 ew ku ji wan re: Aramî
ev e, yê westayî rawestînin;
rawestin jî ev e! got. Lê belê
nexwestin ku bibihîzin. 13 Ji ber
vêya, gotina XUDAN bona wan
emir li ser emrê, emir li ser emrê,
zagon li ser zagonê, zagon li ser
zagonê; hinek li vir, hinek li wir

*1* Gotinên vê ayetê, di zimanê Îbranî de wusa ne: Sav lasav, sav lasav, kav lakav, kav lakav, zeer şam, zeer şam!

bibe ku, bila herin û bi ser piştê ve
bikevin û bişikên û bikevin dafikê
û bên girtin.

*Kevirê Quncikê Yê Biqîmet*
Rom 9,30-33; 1.Pêt 2,4-8

14 Ji ber vêya, ya zilamên qerfok,
hûn ku, li Orşelîmê, li ser vê nete-
wa serweriyê dajon, gotina XU-
DAN bibihîzin! 15 Madem ku we
gotin: Me bi mirinê ve peymanê
danîn û bi warê miriyan re li hev
kirin; dema asîwa har derbas
bibe, dê negihêje me; ji ber ku me
derewan ji xwe re kirin cîhê sitar-
gehê û me xwe di bin fenekiyê
de veşartin. 16 Xudan, XUDAN
jî wusa dibêje: A vay, li Siyonê
bi bingehîn kevirekî, kevirek ku
hatiye ceribandin, kevirê qunci-
kê[1] yê biqîmet, yê ku bingeha wî
ewledar e danîm; yê ku baweriya
xwe bîne bitirs lez nake. 17 Û ez
ê dadiyê bikim benê pîvanê û ras-
tiyê jî bikim şakul û dê zîpik cîhê
sitariyê, ê ku bi derewan ve hati-
ye damezirandin bimale û bibe û
dê av ji ser cîhê veşartinê ve here.
18 Û peymana we, ya ku we bi
mirinê ve danîbûn, dê xera bibe
û li hevhatina we û ya warê mi-
riyan dê nemîne; dema asîwa har
derbas bibe, hûn ê bi wê ve werin
çûtin. 19 Her ku derbas bibe, dê
bi we bigire; ji ber ku dê ji sibê
heta sibehê şev û roj derbas bibin
û jê agahî girtin jî dê bi toqîn be.
20 Ji ber ku bona dirêjbûnê doşek
kin û bona nuxumandinê xêlî teng
e. 21 Ji ber ku dê XUDAN, mîna
di çiyayê Peratsîmê de kiriye dê
rabe, mîna li geliya Gîbeonê bûye
dê hêrs bibe ku, bila karê xwe,
karê ku pê xerîb tê û karmendiya
xwe, karmendiya xwe ya ku pê
xerîb tê bike. 22 Û niha hûn jî ji
qerfokan nebin, ya na dê zincîrên
we bête xwurt kirin; ji ber ku fer-
mana bona helaqiya hemûya dinê
ye, ji Xudanê artêşan XUDAN ve
bihîstim.
23 Guh bidin û dengê min bibihî-
zin; qenc guhdarî bikin û gotina
min bibihîzin! 24 Ma cotkar bona
ku biçîne her tim cotê dike? Ma
her tim axa xwe vedike û rapêlkê
derbas dike? 25 Ma gava rûyê wê
serrast bike reşreşikê belav nake û
reşke[2] naweşîne? Û genim li rêzan
û ceh li cîhê ku jê re cihê kiriye
û çewderê jî li kêleka wê nake?
26 Ji ber ku Xwedayê wî rastiyê
hînî wî dike û wî fêr dike. 27 Ji ber
ku reşreşik bi cercera bênderan
nayê gêr kirin û tekera erebê li ser
reşkê ve nayê zivirandin; lê belê
reşreşik bi ço û reşke jî bi şivê ve
tête kutan. 28 Ma genimê nan tête
eciqandin? Na, her tim wê nakute
û ger tekera ereba wî û hespên wî

[1] Goşe, qorzîk.

[2] Kemyon.

wê biweşînin jî, ew wê naeciqîne.
29 Ev jî ji XUDANê artêşan der-
dikeve; di şîreta xwe de ecêb e, di
zaniyariyê de mezin e.

*Wey li Bajarê Dawid*

29 Wey li Arîêl[1], Arîêl, ba-
jarê ku Dawid arteşgehê lê
danî bû, heyfa te! Salan tevî salan
bikin; hela bila cejn bifilite! 2 Û ez
ê wê gavê cîh li Arîêlê teng bikim
û dê feryad û fîxan biqetin û dê
ji min re bibe mîna Arîêl. 3 Û ez
ê li dijî te, çar hawirdor artêşgehê
deynim û leşkeran deynim û dora
te bigirim û ez ê li dijî te meterîsan
deynim. 4 Û tuyê bête nizm kirin
û ji erdê ve gotinê bibêje û dê ji
nava tozê gotina te xizokî were û
dê dengê te mîna dengê cinvan ji
erdê ve derkevî û dê gotina te ji
nava axê ve piste pistê bike.
5 Lê belê ajaweya neyarên te dê
mîna tozekî zirav bibe û ajaweya
zilamên tirsehêz, mîna hûrika
kayê ya ku diçe û derbas dibe be;
ev kar jî dê di demek nişka ve
de bibe. 6 Dê ji aliyê XUDANê
artêşan bi gurmîniya ezmanan û
bi erdhejînê û bi gurmîniya mezin
û bi bahozê û bi rejnebaranê û bi
pêta agirê ku dixwe û diqedîne
sehêtî bête kirin. 7 Û hemû aja-
weya neteweyên ku li dijî Arîêlê
şer kirine, yên ku li dijî hemûya
wê û li dijî bircên wê cengê dikin
û yên ku tengasiyê didin wê, dê
bibin mîna xewnê, mîna xewn
û xeyala şevê. 8 Û dê bibe mîna
xewn dîtina zilamê birçî û a vay,
ew dixwe û hişyar dibe û zik vala
ye; an jî dê bibe mîna xewn dîti-
na zilamê tî û a vay, ev vedixwe
û hişyar dibe û a vay, bîrveçûyî
ye û canê wî ji tîbûnê dişewite;
dê ajaweya hemû neteweyên ku li
dijî Çiyayê Siyonê cengê dikin jî
wusa bibin.
9 Şaş bibin û matmayî bimînin!
Xwe kor bikin û nebînin! Ew
serxweş in, lê belê ne bi xemrê;
tilpekî dibin, lê belê ne ji araqê
ye. 10 Ji ber ku XUDAN ruhekî
xewa giran bi ser we ve rijand û
çavên we girtin; peyxamberan
û yên ku dibînin, serê we nuxu-
mandin. 11 Û bona we her xewn û
xeyal, bû mîna gotinê pirtûkek ku
hatiye mor kirin bû; mirov wê di-
din zilamekî bi xwendinê dizane û
jê re dibêjin: Em rica dikin, vêya
bixwîne! û ew dibêje: Ez nikarim
bixwînim, ji ber ku hatiye mor ki-
rin 12 û bi gotina: Em rica dikin,
vêya bixwîne! didin zilamekî ku
bi xwendinê nizane; ew jî: Ez bi
xwendinê nizanim! dibêje.
13 Û Xudan got: Madem ku ev
netewe nêzîkî min dibe û bi de-
vên xwe û bi lêvên xwe min di-
hesibînin û dilên xwe ji min ve
dûr dixînin û emrê mirovên ku ji

1 Şêrê Xwedê; an jî: Ocaxa Xwedê.

min ve tirsîn jî, ji wan re hatiye
fêr kirinê; 14 ji ber vêya, a vay,
ez ji nû ve di nava vê netewê de
nuwazeyek, belê, nuwazeyek
û tiştekî ku şaş dike bikim û dê
zanîna zilamên zaniyar tune bibe
û dê fêhmkariya zilamên zîrek
bête nuxumandin.
15 Wey li serê wan zilaman ku,
nêtên xwe ji XUDAN ve kûr
vedişêrin û karên wan di tariyê
de ne û ew: Ma kî me dibîne û
kî bi me dizane? dibêjin! 16 Ax
rêşaşiya we! Ma kûzvan bi heriyê
ve yek tê hesibandin ku xanî bona
avakirê xwe bibêje: Wî min ava
nekiriye û tiştê ku şikl lê hatiye
dayîn, bona yê ku şiklê dayiyê bi-
bêje: Fêhmkariya wî nîne?
17 Ma vegerandina Lubnanê ku
hate vegerand zeviyek berdar û
hesibandina zeviya berdar[1] ku
daristan têté hesibandin, êdî dê
di demek zehf kurt de neyê kirin?
18 Û dê ew roj, yên kerr gotinên
pirtûkê bibihîzin û ji nava dûh û
tariyê ve çavên koran bibînin.
19 Û yên nizm, dê kêfxweşiya xwe
ya ku di XUDAN de ye zêde bikin
û di nava mirovan de yên xizan dê
bi Pîrozê Îsraêlê ve kêfxweş bi-
bin. 20 Ji ber ku zilamê tirsehêz
tune bû û dawiya qerfokiyê hat
û hemûyên ku li benda fesadiyê
bûn, hatin jêkirin û avêtin; 21 ew
ku, zilam di doza wî de bisûc der-
dixin û bona zilamê ku di derî de
dipeke, dafikê datînin û bona tu-
neyekê yê salih rêşaş dikin.
22 Ji ber vêya XUDANê ku Bi-
rahîm xelas kiriye, bona mala
Aqûp wusa dibêje: Dê niha Aqûp
şermezar nebe û dê niha wecê wî
neçilmise. 23 Ji ber ku dema za-
rokên wî, di nava xwe de karên
destên min bibînin, dê navê min
pîroz bikin, belê, dê Pîrozê Aqûp
pîroz bikin û ji Xwedayê Îsraêlê
ve bitirsin. 24 Yên ku di ruh de
rêşaş in jî dê bigihêjin fêhmkariyê
û yên ku di ber xwe de diaxifin,
dê dersê bigirin.

*Wey li Gelê ku gotinê guhdarî nake*

Yêr 17,5

30 Wey li serê zarokên asê!
XUDAN dibêje, şîretan
digirin, lê belê ne ji min û bona
ku sûc tevî sûcê bikin peymanê
dibirin, lê belê ne bi Ruhê min;
2 ew ku, bona bi hêza Fîrawûn
xwurt bibin û bona ku xwe bidin
bin siya Misirê, ji bo ku dakevin
Misirê derdikevin rê; lê belê li
devê min nepirsîn! 3 Û dê hêza
Fîrawûn bona we bibe şermezarî
û xwe dana bin siya Misirê jî dê
bona we bibe rezaletî. 4 Ji ber
ku serokên wan li Tsoanê ye û
şandiyên wan gîhaştin Hanesê.
5 Ji ber netewa ku qenciya wê
nîne dê gişt şermezar bibin, ew

[1] An jî: Karmel.

*Bi Misirê ewle nebin*

31 Wey ji wan zilaman re ku,
bona alîkariyê bibînin, da-
dikevin Misirê û bi hespan û ji ber
ku pirr in ji erebeyên cengê û ji
ber ku xwurt in bi siwaran ve ewle
dibin; lê belê li Pîrozê Îsraêlê na-
nihêrin û li XUDAN nagerin! 2 Lê
belê XUDAN jî zaniyar e û asîwê
tîne û gotinên xwe şunda venagerî-
ne û li dijî mala yên ku xerabiyê
dikin û li dijî alîkariya yên ku xe-
rabiyê dikin radibe. 3 Û Misirî ne
Xwedê ne, mirov in û hespên wan
ne ruh in, lê belê goşt in û dema
XUDAN destê xwe dirêj bike, yê
ku alîkariyê dike dê tilpekî bibe,
yê ku alîkariyê dibîne jî dikeve û
gişt pev re telef dibin.
4 Ji ber ku XUDAN ji min re
wusa dibêjî: Şêr û şêrê ciwan li
ser nêçîra xwe çawa bigurmin,
li dijî wî çawa ku bangî ajaweya
şivanan hatibe kirin, ew ji dengên
wan netirse û çawa ji dengezara
wan nebizde, XUDANê artêşan jî
li ser Çiyayê Siyonê û li ser girê
wê bona ku cengê bike, dê wusa
dakeve. 5 Civîk çawa bazikên
xwe vedikin, dê XUDANê artêşan
jî Orşelîmê wusa biparêze; dê wê
biparêze û azad bike, derbas bibe
û xelas bike[1]. 6 Vegerin zatê ku
hûn li dijî wî ketin rêşaşiyek kûr,
ya lawên Îsraêl! 7 Ji ber ku dê
ew roj her kes pûtên xwe yî zîvî
û pûtên xwe yî zêrînî bavêjin, ew
pûtan, ên ku destên we bona ji we
re bibin sûc wan çêkirin. 8 Û dê
Asûr bi şûr ve bikeve, ne bi şûrê
mirov û dê şûr wê bixwe û biqe-
dîne, ne bi şûrê zilaman û dê şûr ji
ber bireve û egîdên wî yên ciwan
bibin suxrekar. 9 Û dê zinara wî ji
tirsê tune bibe û serokên wî ji alê
bêzar bibin, XUDANê ku agirê
wî li Siyonê û firna wî li Orşelîmê
ye dibêje.

*Qiralê Aştiyê*

32 A vay, qiralek bi rastiyê dê
qiraletiyê bike û serok jî bi
dadiyê dê serweriyê bikin. 2 Û dê
mirov mîna cîhê ku ji bayê xwe
vedişêre û li dijî rêjnê mîna cîhekî
girtî; li cîhê şorex, mîna avên ku
diherikin, dê li warê ku diwestîne
bibe mîna siya zinara mezin. 3 Û
dê çavên yên ku bibînin neyên gir-
tin û guhên kesên ku bibihîzin, dê
balkêş bibin. 4 Û dê dilê cansivi-
kan zanînê fêhm bikin û zimanên
tutikan di bi eşkeretî gotinê de
lez bibin. 5 Êdî dê ji ehmeq re
biesil neyê gotin û ji çikot re co-
merd neyê gotin. 6 Ji ber ku dê
ehmeq, bona fesadî kirin û li dijî
XUDAN gotinên ku rêşaş in, zikê
yê birçî vala hiştin û avê ji ber yê
tî parastinê bi ehmeqî bibêje û dê
dilê wî xerabiyê bike. 7 Û haletên
çikot xerab in; yê xizan bi rastiyê

1 (2.Mûsa 12:13)

bibêje jî, yê xerab dek û dolabê datî-
ne û pêşniyarê dike ku, yên nizm
bi gotinên derewîn ve helaq bike.
8 Lê belê yê biesil, pêşniyara
tiştên biesil dike û dê bi tiştên bie-
sil li ser pêlan bimîne.
9 Ya pîrekno, yên ku di nava re-
hetiyê de dijîn, rabin, dengê min
bibihîzin; ya qîzikên bêxem, guh
bidin gotina min! 10 Dê roj der-
basî ser salê bibin û hûn ê bileri-
zin, ya pîrekên bêxem; ji ber ku
dê dawiya rez xerakirinê were,
danhevdana mêwan neyê. 11 Bi-
lerizin, ya pîrekno, yên ku di nava
rehetiyê de dijîn; bihejin, ya yên
bêxem; kincên xwe ji xwe bikin
û xwe tazî bikin û cilikan li piştên
xwe bikin! 12 Dê bona zeviyên
xweşik, bona mêwên bi fêkî ew
ê li xwe bixin. 13 Dê li ser erdê
netewa min, belê, li bajarê bi şahî,
li ser hemû xaniyên wê yên fireh
dê qirş û kelem derkevin. 14 Ji
ber ku dê seray bêkes bimîne; ba-
jarê ku bi ajaweyî dê bête berdan:
Ofel û qûleya nêrînvan dê abadîn
bibin şikeftên cenawiran, cîhên
ku kerên biyan lê kêfxweş dibin,
dê bibin çêregeha keriyan; 15 dê
heta wê wextî ji jor ve Ruh bi ser
me ve bête rijandin û dê çol bibe
zeviyekî berdar û dê zeviya berdar
daristan bê hesibandin.
16 Û dê wê gavê dad li çolê bite-
bite û rastî jî li zeviya berdar rûne.
17 Û dê karê rastiyê bibe selamet
û dê bera rastiyê hişbûna abadîn û
ewlebûn be. 18 Û dê netewa min
li welatê selametiyê û li şunwarên
ewlekar û li cîhê xwe yî rehet
rûnin. 19 Lê belê dê di ketina da-
ristanê de zîpik bibare û dê bajar
bitûmî bête nizm kirin. 20 Yên
ku di qeraxa hemû avan de tovê
direşînin, yên ku lingên ker û ga
dişînin gerê; xwezî li we!

*Lavayên bona alîkariyê*

33 Wey li te, ya yê wêranxanan
çêdike û tu nehat xerabe kirin
û ya xayîn û xayîntiyê li te nekirin!
Dema tu wêrankirinê biqedînî, tuyê
jî bête xerabe kirin û dema tu dev
ji xayîntiyê berde dê li te jî xayîn-
tiyê bikin! 2 Ya XUDAN, xêrê ji
me re bike! Em li benda te man; her
sibeh ji me re bibe bazû, di dema
tengasiyê de ji me re bibe xelasî
jî. 3 Ji gurmîniya welwelê netewe
reviyan; dema te xwe bilind kir gel
belav bûn. 4 Kullî çawa didin hev,
dê malên we yê talanê jî wusa bête
hevdan; dê mîna êrîşa kulliyan êrîşî
ser wan bikin. 5 XUDAN bilind bû;
ji ber ku li cîhê bilind rûdine, bi dad
û rastiyê Siyonê dagirt. 6 Û dê di
demên te de ewlekarî, xelasî, zani-
yarî û zêdeyiya zanînê hebin; tirsa
XUDAN, xezîneya te ew e.
7 A vay, egîdên wan li derve ha-
warê dikin; şandiyên wanî aşitiyê
bi jan digirîn. 8 Rêyên mezin bê-
kes, kesek ku ji rê ve derbas bibe

nema; neyar peymanê xera kir, bi
çavê çûkantiyê li bajaran nihêrt,
mirov nehesiband. 9 Welat şînê
dikişîne û zebûniyê dike; Lub-
nan dişerme û dixîze; Şaron mîna
çolê û Başan û Karmel pelên xwe
diweşînin. 10 Niha ez ê rabim,
XUDAN dibêje niha ez ê xwe
bilind bikim; niha ez ê bilind bi-
bim. 11 Hûn ê ji kayê avis bibin
û firêzê bizên; hilma we, agirê ku
we bixwe û biqedîne ye. 12 Û dê
netewe, bibin mîna şewata kilsê,
mîna kelemên ku hatine jêkirin û
di agir de hatine şewitandin.
13 Ya yên li dûr in, ka min çi kiri-
ye guhdarî bikin û ya yên li nêzîkê
ne, hêza min binasin! 14 Yên ku li
Siyonê sûcê kirine bêzar bûn; le-
rizandin bi bêbaweriyan ve girt:
Ma kî ji me dikare li cem agirê ku
dixwe û diqedîne rûne? Kî ji me
dikare li cem agirê abadîn rûne?
15 Yê ku bi maf ve dimeşe û rast
dibêje, qezenca ku bi zulmê ve
tê biçûk dibîne, ji bertîl stendinê
destê xwe diweşîne, ji bo bihîstina
gotina xwîn rijandinê guhê xwe
digire û yê ku bona xerabiyê nebî-
ne, çavên xwe digire; 16 dê ew li
cîhên bilind rûne; bircên zinarê dê
bibin qûleya wî yî bilind; dê nanê
wî bête dayîn; ava wî ewle be.
17 Dê çavên te, di xweşikiya wî
de qiral bibînin; tuyê welatê bêserî
û bêbinî temaşe bikî. 18 Dê dilê
te toqînê bifikire: Kanê, nivîskar li
ku derê ye? Yê ku xeracê diwezîne
li ku ye? Yê ku qûleyan dijmêre li
ku ye? 19 Tuyê êdî wê netewa ji
ser xwe çûyiye nebîne, ew netewe
ku tu dengê wê yî ji kûritiyê ve
tê fêhm nake, zimanê wê yî tutik
fêhm nake. 20 Li Siyona ku bajarê
cejnên me yên bijartî ye binêre!
Dê çavên te Orşelîmê, welatekî
aramî, mîna çadirekî sîxên wê qet
nayên derketin û yek ji tayên wê
jî qet naqete û tu carî nalerize bi-
bînin. 21 Lê belê XUDAN li wir,
di nava mezinahiyê de, dê bi me
re be, dê li wir cîhê çemên fireh û
şetan hebin, dê di wê de keştiyên
bi bêr nemeşin û di wê de keştiya
bi qudret derbas nebe. 22 Ji ber ku
serwerê me XUDAN e, yê ku za-
gona me daniye XUDAN e, qiralê
me XUDAN e; yê ku dê me xelas
bike ew e. 23 Tayên te sist bûn;
hêz neanîn ku binya sitûna serenê
bizexmînin, xêliyê venekirin; wê
gavê gellek talana şelandinan ha-
tin par kirin; heta yên qop jî talanê
rahiştin. 24 Û yê ku li wir rûdine,
dê nebêje: Ez nexweş im, dê fe-
sadiya netewa ku li wir rûdine bê
borîn.

*Dê XUDAN Gelan biceza bike*

34 Ya gelno, bona bihîstinê
nêzîk bibin û ya neteweno,
qenc guhdarî bikin; dinya û yên di
hundirê wê de ne; erd û hemûyên
ku ji wê derketine bila bibihîzin! 2

Ji ber ku hêrsa XUDAN bi hemû
neteweyan re, xeyda wî bi hemû
artêşên wan ve heye; wan bitûm
bitûm tune kir, wan da serjêkirinê.
3 Û yên ku ji wan hatine kuştin,
dê bên avêtinî derve û dê bêhna
laşên wan derkevin û dê çiya bi
xwînê ve buhulin. 4 Û dê hemû
artêşa ezmanan buhule û ezman,
mîna tomarekî bête lihevgerandin
û hemû artêşên wan, mîna ku ji
mêwê pel biweşin û mîna pelên ku
ji darê hêjîrê diweşin, dê biweşin.
5 Ji ber ku şûrê min li ezmanan
têra xwe vexwar; a vay, dê bona
daraziyê dakeve ser Edomê
û netewa ku naletê lê kirime.
6 Şûrê XUDAN têrî xwînê, xwîna
berxik û nêriyan bû, bi bez, bi
bezê gurçikên beranan ve hate rûn
kirin; ji ber ku li Botsrayê qurban
û li warê Edomê şikestandina
mezin ya XUDAN heye. 7 Û dê
tevî wan gakovî û tevî gayan jî
golik dakevin û dê warên wan têrî
xwînê bibe û ji rûn dê erdê wan
qelew bibe.
8 Ji ber ku roja tolhildana XU-
DAN, ji ber doza Siyonê sala wî
ya bersivê heye. 9 Û dê geliyên
Edomê bizivirin ziftê û axa wî bi-
zivire kewkurdê û dê warê wî bibe
zifta ku dişewite. 10 Dê bi şev û
roj venemire; dûhê wê abadîn der-
keve; ji nifşeyan heta nifşê dê ten-
ha bimîne; her tim û abadîn dê tu
kes ji hundirê wê ve derbas nebe.
11 Dê tenê bibe milkê zengilok û
jûjî û dê li wir kund û qirik rûnin û
dê benê şaşbûnê û şakûla valahiyê
bi ser wê ve bişidîne. 12 Dê bona
qiraletiyê bangî began bikin, lê
belê dê qet yek jî ne li wir bin û dê
hemû serokên wê bibin tunehiyek.
13 Û dê di qesrên wê de kelem û
di bircên wê de gezok û kelemên
reş qam bidin û dê welatê çeqelan
bibe hewşa heştirmeyan. 14 Û dê
heywanên hov yên çolê û gur bên
cem hev û pezkovî dê bangî he-
valê xwe bike; belê, dê cenawirê
şevê li wir bi cîh bibe û bona xwe
dê cîhê rawestinê bibîne. 15 Dê
marê kevanê qulika xwe li wir çê-
bike û hêka bike û çêlikên xwe dê
derxîne û di bin siya xwe de wan
bicivîne; belê, başoke li wir, dê
her yek tevî hevala xwe bicivin.
16 Di pirtûka XUDAN de lê-
kolînê bikin û bixwînin; dê ji
vana tu jî kêm nemîne, hevala tu
yekî jî dê kêm nebe; ji ber ku devê
wî emir da û Ruhê wî wan li wir
civandin. 17 Bona wan, wî pişkê
kişand û destê wî bi tayê pîvanê ji
wan re par kirin; dê abadîn bibe
milkê wan; ji nifşê heta nifşeyan
dê li wir rûnin.

*Serweriya XUDAN*

35 Dê çol û cîhê şorex kêfxweş
bibin û beyar kêfxweş bibe û
mîna nêrgizê dê bi çîçeg bibe. 2 Dê
bi zêdeyî bi çîçeg bibe û dê bi kêf

û sitirandinê kêfxweş bibe; dê me-
zinahiya Lubnanê, rewnaqiya Kar-
mel û Şaronê ji wê re bête dayîn; dê
ew ê mezinahiya XUDAN, rewna-
qiya Xwedayê me bibînin.
3 Dêstên lawaz xwurt bikin û
çongên ku dilerizin zexm bikin!
4 Ji yên ku dilên wan bizdonek in
re bibêjin: Xwurt bibin, metirsin;
a vay, Xwedayê we! Tol, bersiva
Xwedê, tê; ew bi xwe tê û dê we
xelas bike!
5 Dê wê gavê çavên koran vebin,
guhên kerran jî vebin. 6 Wê gavê
dê zilamê qop mîna askê hol bibe
û dê zimanê yê lal bistirê; ji ber
ku dê li çolê av û li beyar jî lehî
bipejiqin. 7 Û dê qûma germ bibe
burkek û axa bê av jî bibe bin-
gehên avê; dê welatê ku çeqel lê
radikevin bibe qamirgeh, delavgi-
ya û giya. 8 Û dê li wir rêgeh û rê
hebe û dê jê re Rêya Pîroziyê bête
gotin; dê zilamê mindar jê derbas
nebe; dê tenê bona yê ku xelas
bûne be; yên ku di rê de dimeşin,
heta zilamên çavzîq jî, dê jê şaş
nebin. 9 Lê li wir şêr tune be û
heywanê hov dernekeve ser wê
rêya; dê ew li wir nebin; li wir tenê
yên ku hatine xelas kirin bimeşin.
10 Û yên ku XUDAN wan xelas
kirine dê vegerin û bi sitirandinê
bigehêjin Siyonê û dê li ser serê
wan, kêfxweşiya abadîn hebe; dê
bigehêjin kêfxweşî û şahiyê û dê
keser û nalîn bireve û here.

*Gefên Sanherîb*

2.Dîr 32,9-16

36 Û wusa bû ku, di çardeh
saliya qiral Hîzkiya de,
Sanherîbê qiralê Asûrê, li dijî
hemû bajarên Cihûda, yên ku
bi dîwar in sekinî û wan bi dest
ve xistin. 2 Û Rabşakeyê qi-
ralê Asûrê, bi pirr leşkeran ve ji
Lakîşê şand Orşelîmê, cem qiral
Hîzkiya. Û Rabşake li rêgeha ze-
viya daweşînerê, li cem rêya ava
burka jorîn ve sekinî. 3 Wê gavê
Elyakîmê lawê Hîlkiya yê ku li
ser rêya mala qiral e û katib Şebna
û bûyernivîs Yoahê lawê Asaf,
hilkişiyan cem wî.
4 Û Rabşake ji wan re got: Niha ji
Hîzkiya re bibêjin: Qiralê mezin,
qiralê Asûrê wusa dibêje: Ev tiştê
tu pê ewle yî çi ye ku, tu pê ewle
yî? 5 Şîreta te û bona cengê hêza
te tenê gotinên vala ne, dibêjim;
ma niha tu bi kî ewle dibe ku, tu li
dijî min rabû? 6 A vay, ji vî çoyê
qamirî ê şikestî, bi Misirê ewle
dibe; her kî ku xwe bide ser wê
dê di destê wî ve rabe û wê qul
bike; qiralê Misirê Fîrawûn, bona
hemûyên ku pê bawer in wusa ye.
7 Û ger tu ji min re: Ez bi Xwe-
dayê xwe XUDAN re ewle me
bibêjî, ma ew ne îlahê ku Hîzki-
ya, ji Cihûda û Orşelîmê re: Hûn
ê li ber vê pêşkêşîgehê peristinê
bikin got û cîhên wî yên bilind û
pêşkêşîgehên wî ji holê rakirin?

8 Û niha, haydê bi efendiyê min,
qiralê Asûrê re şertê bigire û ger
tu bikaribî ji aliyê xwe ve siwaran
deyne ser wan, ez ê du hezar hespî
bidim te. 9 Ma wê gavê tuyê çawa
bikaribî ku ji qulên herî biçûk ên
efendiyê min, wecê karmendekî
şunda vegerînî û bona erebeyên
cengê û siwariyan bi Misirê ve
ewle bibî? 10 Û niha ma ez, qey
bêyî emrê XUDAN, bona wêran
kirina vê şûnê li dijî wî rabûm?
XUDAN ji min re got: Li dijî vî
warî derkeve û wê xerabe bike!
11 Û Elyakîm û Şebna û Yoah, ji
Rabşake re gotin: Em rica dikin,
ji van qûlên xwe re, bi zimanê
Aramî ve bibêje; ji ber ku em wê
fêhm dikin û dema netewa ku li
ser dîwêr e dibihîze, bi Cihûdîtî
ji me re nebêje. 12 Û Rabşake
ji wan re got: Ma bona ku ez
van gotinan bibêjim, efendiyê
min, min ji efendiyê te û ji te re
şandiye? Ma ji van zilamên ku li
ser dîwêr rûniştine û dê tevî we
pîsitiya xwe bixwin û mîza xwe
vexwin re neşandiye?
13 Û Rabşake sekinî û bi Cihûdî,
bi dengekî bilind qêriya û got: Go-
tinên qiralê mezin, qiralê Asûrê bi-
bihîzin! 14 Qiral wusa dibêjî: Bila
Hîzkiya we nexapîne; ji ber ku dê
hêza wî, bona xelaskirina we qîm
neke! 15 Û bila Hîzkiya, bi gotina:
Dê XUDAN muheqeq me xelas
bike, dê ev bajêr bi destê qiralê
Asûrê ve nekeve we bi XUDAN
re ewle neke! 16 Hîzkiya guhdarî
mekin; ji ber ku qiralê Asûrê wusa
dibêje: Bi min re aşitiyê bikin û
bona min derkevin derve; 17 heta
ku ez werim û we bibim welatekî
mîna welatê we ê nan û genim e,
bibim welatê genim û xemra teze,
bila her kes ji mêwa xwe û her kes
ji darê xwe bixwe û her kes ji sarin-
ca xwe vexwe. 18 Xwe biparêzin;
bila Hîzkiya, bi gotina: Dê XU-
DAN me xelas bike! we nexapîne.
Ma qet ji îlahên gelan yek jî welatê
xwe ji destê qiralê Asûrê xelas
kirine? 19 Ma ka îlahên Hamat û
Arpadê? Kanê îlahên Sefarvaîmê li
ku derê ne? Û ma Samîriyê ji destê
min ve xelas kirin? 20 Ma ji nava
hemû îlahên van welatan, yên ku
welatê xwe ji destê min ve xelas
kirine kî ne ku, XUDAN Orşelîmê
ji destê min ve xelas bike?
21 Û ew bêdeng man û gotinekê
jî bersiva wî nedan; ji ber, bona
ku bersivê nedin wî, ev emrê qiral
bû. 22 Û Elyakîmê lawê Hîlkiya
yê ku li ser rêya mala qiral e û
katib Şebna û bûyernivîs Yoahê
lawê Asaf, bi rewşekî kincên wan
hatine çirandin hatin cem Hîzkiya
û gotinên Rabşake gîhandin wî.

*Hîzkiya serî li Îşaya dide*

2.Qir 19,1-13

37 Û wusa bû ku, dema qiral
Hîzkiya vêya bihîst, kin-

cên xwe çirand û cilikek li xwe
gerand û ket mala XUDAN. 2 Û
Elyakîmê ku li ser mala qiral e û
katib Şebna û kalepîrên kahînan,
bi cilik girêdanê şand cem Pey-
xamber Îşayayê lawê Amots. 3 Û
jê re gotin: Hîzkiya wusa dibêje:
Îro roja xeyd û tengasî û şermê
ye; ji ber ku dema welidîna zaro-
kan hat, lê belê hêza ku biwelidî-
ne nîne! 4 Dibe ku Xwedayê te,
gotinên Rabşakeyê ku efendiyê
wî, qiralê Asûrê bona ku ji Xwe-
dayê zindî ye re qadê bixwaze
şandine bibihîze û Xwedayê te
XUDAN, ji ber wan gotinên ku
bihîstiye pê bipeke; ji ber vê yekê
bona yên li paş mayîne û di dest
de ne, lavayên xwe bilind bike!
5 Û qûlên qiral Hîzkiya hatin cem
Îşaya. 6 Û Îşaya ji wan re got:
Hûn ê ji efendiyê xwe re wusa
bibêjin: XUDAN wusa dibêje:
Ji ber gotinên ku xulamên qiralê
Asûrê, bona ku kufrê ji min re di-
kin metirse! 7 A vay, ez ê ruhekî
têxim hundirê wî û dê agahiyekê
bibihîze û dê vegere welatê xwe
û ez ê li welatê wî, wî bi şûr ve
bixînim!
8 Û Rabşake zivirî û qiralê Asûrê,
li dijî Lîbnayê di cengê de dît;
ji ber ku ji Lakîşê koç kirina wî
bihîstibû. 9 Û bona qiralê Hebeşê
Tîrhaqa: Bona ku li dijî te cengê
bike derket, bihîst. Û gava vêya
bihîst, şandiyan ji Hîzkiya re şand
û got: 10 Hûn ê ji qiralê Cihûdan
Hîzkiya re biaxifin û wusa bi-
bêjin: Bi gotina ku dê Orşelîm ji
qiralê Asûrê re neyê dayîn, bila
Xwedayê te, ê ku tu pê ewle yî,
te nexapîne! 11 A vay, tiştên ku
qiralên Asûrê hemû welatan tune
kirine û bi wan re kirine te bihîst
û ma tuyê qey xelas bibî? 12 Ma
îlahên wan, gelên ku bapîrên min,
wan helaq kirine, Gozan û Haran
û Retsef û lawên Edenê ên ku li
Telassarê ne, xelas kirin? 13 Ma
qiralê Hamadê û qiralê Arpadê
û qiralên bajarên Sefarvaîm û yê
Hena û qiralê Îvva li ku derê ne?

*Duaya Hîzkiya û Bersiva XUDAN*
2.Qir 19,14-37; 2.Dîr 32,20-21

14 Û Hîzkiya nameyê ji destên
şandiyan stend û wê xwend û Hîz-
kiya hilkişiya mala XUDAN û wê
vekir û danî ber XUDAN. 15 Û
Hîzkiya li ber XUDAN geriya û
got: 16 Ya XUDANê artêşan, yê ku
li ser kerûbiyan rûniştiye, Xwedayê
Îsraêlê, Xwedayê hemû qiraletiyên
dinê tu yî; te erd û ezman afirandi-
ye. 17 Ya XUDAN, guhê xwe xwar
bike û bibihîze! Ya XUDAN, ça-
vên xwe veke û bibîne! Belê, van
gotinên ku Sanherîb bona ku qadê
ji Xwedayê ku zindî ye dixwaze
şandiye bibihîze! 18 Ya XUDAN,
qiralên Asûrê, bi rastî hemû nete-
weyan û welatên wan 19 û îlahên
wan avêtin agir; ji ber ku ew ne îlah

bûn, tenê karên destên mirovan, dar
û kevir bûn; bo vê yekê wan tune
kirin. 20 Û niha, ya XUDAN Xwe-
dayê me, me ji destê wî xelas bike
û bila hemû qiraletiyên dinê bizani-
bin ku, XUDAN tu yî, tenê tu yî!
21 Û Îşayayê lawê Amots ji Hîz-
kiya re şand û got: Xwedayê
Îsraêlê XUDAN, wusa dibêje:
Madem ku te li dijî qiralê Asûrê
Sanherîb, ji min re dua kir,
22 gotina ku XUDAN di derheqê
wî de dibêje ev e: Qîza Siyonê,
qîza ku neçûye mêr, te biçûk dît û
qerfê xwe bi te kir; qîza Orşelîmê
li paşî te serê xwe kil kir. 23 Ma
te kî bangî qadê kir û te ji kê re
kufur kir? Û ma te li dijî kî dengê
xwe bilind kir û çavên xwe berbi
jor ve rakir? Li dijî Pîrozê Îsraêlê!
24 Te bi destê qûlên xwe qadê ji
XUDAN re xwest û te got: Ez bi
ajaweya erebeyên xwe yî cengê
derketim girê çiyayan, herî cîhên
Lubnanê yê hundirîn û ez ê darên
erzê yên dirêj û darên serwî yên
bijartî jê bikim; ez ê herim girên
wî yên dawîn û bikevim daristana
bexçê wî; 25 min bîran kola û avê
vexwar û bi navkoya lingê xwe ez
ê hemû çemên Misirê ziwa bikim!
26 Ma ji demê dûr ve tiştê ku
wî kiriye û pêşniyara ku ji rojên
kevn ve kiriye, te nebihîst? Niha
vêya kirim ku, bila vergerandina
bajarên bi dîwar ku tu vegerîne
komên wêranxana, bibe karê te.
27 Ji ber vêya, hêza yên ku li wan
bajaran rûdiniştin hindik bû, ketin
bêzarî û şermezariyê, mîna gîhayê
beyarê û mîna gîhayê hêşîn, mîna
gîhayê ser xaniyan û mîna zadê
ku berê bigihêje, ji aliyê ba ve
hatiye şewitandin bûn. 28 Û ez bi
rûniştina te û ketin û derketina te
û li dijî min qûriniya te dizanim.
29 Ji ber ku te li dijî min qûriniyê
kir û kanciya te gîhaşt guhê min,
ez ê xelîka xwe têxim pozê te û
hefsarê xwe têxim devê te û ez ê
te ji rêya ku tu hatiye şunda ve-
gerînim!
30 Û dê ev ji te re bibe nîşan: Hûn
ê îsal yê bi xwe derketiye û sala
duwemîn, yê ku ji wê derketiye
bixwin û di sala sêwemîn de çan-
din û çîninê bikin û mêwên wan
bixwin! 31 Û yê ku ji mala Cihû-
da xelas bibe, dê berbi jêr ve rehê
berde û berbi jorîn ve mêwê bide.
32 Ji ber ku yên ji ber mayîne dê ji
Orşelîmê, yên xelas bûne dê ji Çi-
yayê Siyonê ve derkevin. Dê xîre-
ta XUDANê artêşan vêya bike!
33 Ji ber vêya, XUDAN bona qi-
ralê Asûrê wusa dibêje: Dê neyê
vî bajarî û li wir tîrê navêje û dê
bi mertalê ve dernekeve ber wî û li
dijî wî dê sitargehê daneyne. 34 Dê
ji rêya ku hatiye, şunda vegere û
dê neyê vî bajarî! XUDAN dibêje.
35 Ji ber ku bona xwe û bona xa-
tirê qûlê xwe Dawid, bona ku xelas
bikim ez ê vî bajarî biparêzim!

36 Û milyaketê XUDAN derket
û di artêşgeha Asûrê de li sed û
heyştê û pênc hezar kesî ve xist û
dema sibehê, zilaman zû rabûn, a
vay, gişt laşên miriyan bûn. 37 Û
qiralê Asûrê Sanherîb koç kir û çû
û şunda vegeriya û li Neynowa ve
rûnişt. 38 Û wusa bû ku, dema di
mala îlahê xwe Nîsrok de peristinê
dikir, lawên wî Adrammelek û
Şaretser bi şûr lê xistin û reviyan
welatê Araratê. Û li dêvla wî, lawê
wî Esar-Haddon bû qiral.

*Nexweşiya Hîzkiya*

2.Qir 20,1-11; 2.Dîr 32,24

**38** Di wan rojan de Hîzkiya,
qasî ku bimire nexweş
ket. Û peyxamber Îşayayê lawê
Amots hate û jê re got: XUDAN
wusa dibêje: Wesiyeta xwe ji
mala xwe re bike, ji ber ku tuyê
nejî, tuyê bimirî! 2 Û Hîzkiya
berê wecê xwe da dîwêr û li ber
XUDAN geriya û got: 3 Ax ya
XUDAN, ez lava dikim! çawa ez
li ber te bi rasteqîniyê û bi hemû
dilê xwe meşiyam û tiştê ku di
çavê te de qenc e kirim, di bîra
xwe de bîne! Û Hîzkiya zehf gi-
riya. 4 Û vê gotina XUDAN ji
Îşaya re hat: 5 Here û ji Hîzki-
ya re bibêje: Xwedayê bapîrê te
Dawid; XUDAN wusa dibêje:
Dua te bihîstim, hêstirên çavên te
dîtim; a vay, ez ê panzdeh sal tevî
ser rojên te bikim. 6 Û ez ê te û
vî bajêrî ji nav lepên qiralê Asûrê
ve xelas bikim û ez ê vî bajarî xe-
las bikim. 7 Û dê bona kirina vî
tiştê ku XUDAN got, dê ji aliyê
XUDAN ve ji te re ev bibe nîşan;
8 a vay, ez ê ji saeta rojê ya Ahaz,
siya ku daketiye ser dereceyan
deh derece paşê vegerînim. Bi
vî awayî roj, di saeta rojê ya ku
dadiket ser de deh derece paşê
ve hat.

9 Gava qiralê Cihûda Hîzkiya
nexweş ket û ji vê nexweşiya xwe
şîfa dît, vêya nivîsand:

10 Gotim: Ez di nîvroja rojên xwe
de, li ser daketina deriyên warê
miriyan im; ez ji mayiya salên
xwe mehrûm mam.

11 Gotim: Ez ê XUDAN, di warê
zindiyan de XUDAN nebînim; di
nava yên ku li dinê rûdinin de, êdî
ez ê mirovan nebînim.

12 Welatê min koç kir û mîna
çadira şivanekî ji cem min hate
ajotin.

Min jiyana xwe mîna çilagê
pêçand; dê ew min ji ragehiştinê
qut bike.

Tuyê di navbera sibeh û şevê de
dawiya min bîne.

13 Heta sibehê xwe bêdeng ki-
rim, şêr çawa bişikîne; hemû hes-
tiyên min wusa dişikîne. Tuyê di
navbera sibeh û şevê de dawiya
min bîne!

14 Hechecîk an jî qulinc çawa
vîtevît bikin, wusa vîte vît kirim;

mîna qumriyê naliyam. Çavên
min ji ber li jor nêrînê lawaz ke-
tin: Ya XUDAN, zulmê li min di-
kin! tu ji min re bibe kefîl!
15 Ez bêjim çi? Yê ku ji min re
dibêje jî ew e, dike jî ew e. Ji ber-
ya êşa ku di canê min de ye, ez ê
di tûmiya jiyana xwe de bi giranî
bimeşim. 16 Ya Xudan! mirov bi
vana ve dijîn û jiyana ruhê min
tim di vana de ye. Bo vê yekê
min baş bike û min bijîne. 17 A
vay, zehf tahliya ji bo min, bona
selameta min bû: Lê belê, ji ber
ku te ji canê min hez kir, te min ji
kortala rizandinê xelas kir; ji ber
ku te hemû sûcên min avêt paşî
pişta xwe!
18 Ji ber ku warê miriyan nikare ji
te re şikir bike, mirin nikare pesnê
te bide; yên ku daketine kortalê
nikarin hêviya xwe bi rastiya te
ve girê bidin.
19 Yê ku dijî, yê ku dijî, mîna ku
îroj ez dikim, dê ew hemdê ji te
re bike:
Dê bav rasteqîniya te bigehîne
zarokan. 20 XUDAN, bona ku
min xelas bike amade ye û di
mala XUDAN de, di hemû rojên
temenê xwe de, em ê qesîdeyên
min bi sazan ve bistirên!
21 Û Îşaya gotibû: Bila hêjîra hişk
rahêlin û bieciqînin û deynin ser
pizzikê û dê baş bibe! 22 Û Hîz-
kiya: Nîşana derketina minî mala
XUDAN çî ye? gotibû.

*Bêaqiliya Hîzkiya*

2.Qir 20,12-19; 2.Dîr 32,25-26

39 Di wê demê de Merodak-
Baladanê ku lawê qiralê
Babîlê Baladan e, tevî nameyan
xelatan ji Hîzkiya re şand; ji ber
ku nexweşketin û başbûna Hîz-
kiya bihîstibû. 2 Û Hîzkiya ji ber
vana kêfxweş bû û mala xwe yî
tiştên biqîmet, zêr û zîvê û biha-
ratê û rûnê biqîmet û mala hemû
çekan û her tiştên ku di xezîne-
yên wî de ne, nîşanî wan da; di
mala wî de û di hemûyê welat de,
tiştekî ku Hîzkiya nîşanî wan ne-
dane nema. 3 Û peyxamber Îşaya
hate cem Hîzkiya û jê re got: Van
zilamana gotin çi? Û ji ku derê
hatin cem te? Û Hîzkiya got:
Ji welatê dûr, ji Babîlê ve hatin
cem min. 4 Û got: Li mala te çi
dîtin? Hîzkiya got: Her tiştên ku
li mala min in dîtin; ji xezîneyên
min, tiştekî ku nîşanî wan nedam
nema. 5 Û Îşaya ji Hîzkiya re got:
Gotina XUDANê artêşan guhdarî
bike! 6 A vay, dê rojan tên ku, dê
her tiştên ku li mala te ne û tiştên
ku bapîrên te heta îroj civandine,
dê bibin Babîlê; tu tiştek dê neyê
hiştin, XUDAN dibêje. 7 Û dê ji
lawên te, ên ku ji te derkeve û ji te
re biwelidin jî dê rahêlin û bibin û
ew ê li qesra qiralê Babîlê dê bi-
bin karmendê serayê. 8 Û Hîzkiya
ji Îşaya re got: Gotina XUDAN
ya ku te gotiye qenc e. Û got: Ji

ber ku dê di rojên min de selamet û ewlekarî hebe.

*XUDAN Gelê xwe xemrevîn dike*

Lûq 3,4-6; Îşa 62,10-11

40 Xwedayê we dibêje: Xem-
revîniyê bikin, xema nete-
wa min jê rakin! 2 Ji dilê Orşelîmê
ve bibêjin; dema wê yî şer gîhaşt,
fesadiya wê lê hate borîn, bona
hemû sûcên wê, ji destê XUDAN
du qat zêde berdêl stend, bi van
gotinan bangî wê bikin.
3 Dengê yê ku bang dike: Di çolê
de rêya XUDAN amade bikin; li
beyarê bona Xwedayê me rêyekê
rast bikin! 4 Dê her gelî bête bi-
lind kirin û her çiya û gir bên
nizm kirin û dê her derê bi nîçik
bên rast kirin û cîhên bi kaş dê
bên deşt kirin! 5 Û dê bilindahi-
ya XUDAN bête şanî dan û hemû
afir dê pev re wî bibînin; ji ber ku
devê XUDAN axifî.
6 Dengê yê ku dibêje: Bang bike!
Û wî got: Ez çi bang bikim? Hemû
afir gîha ye û hemû xweşikiya wan
mîna çîçega beyarê ye. 7 Gîha hişk
dibe, çîçeg diçilmise, ji ber ku hil-
ma XUDAN di ser wê de ba dibe;
bi rastî netewe gîha ye. 8 Gîha hişk
dibe, çîçeg diçilmise; lê belê gotina
Xwedayê me abadîn dimîne.
9 Yê ku mizgîniyê ji Siyonê re
aniye, derkeve çiyayê bilind; yê
ku mizgîniyê ji Orşelîmê re ani-
ye, bi hêz dengê xwe bilind bike;
bilind bike, metirse! Ji bajarên
Cihûda re jî bibêje: A vay, Xwe-
dayê we! 10 A vay, dê Xudan,
XUDAN mîna egîdekî were û
dê bazûya wî bona wî serweriyê
bajo; a vay, heqê wî tevî wî ye û
xelata wî li pêşiya wî ye. 11 Dê
mîna şivanekî pezê xwe bajo, bi
baskê xwe dê berxikan bicivî-
ne û yên ku bimemik in[1] hêdîka
biçêrîne.

*Hêz û Bilindahiya Xwedê*

Rom 11,33-36; Yêr 10,6-16

12 Ma yê ku bi kortika lepê xwe
ve avan dipîvîne û bi bihostan
ve ezmanan dipîvîne û yê ku axa
erdê dikare di olçekê de biebişîne
û yê ku bi teraziyê giran diwezî-
ne kî ye? 13 Ma yê ku pîvanê ji
Ruhê XUDAN re datîne û jê re
dibe şîretkir û hînî wî dike kî ye?
14 Ma zilamê ku ew pê dişêwire,
yê ku fêhmkariyê dide wî û yê ku
di rêya dadiyê de fêrbûnê dide wî
û yê ku zanînê hînî wî dike û yê
ku rêya fêhmkariyê digihîne wî,
kî ye? 15 A vay, gel mîna dilo-
pa ku ji dewlikê ve dikeve û mîna
toza zirava pîvanê tên hesibandin;
a vay, girava mîna toza zirav ya
ku radibe hewayê ne. 16 Û bona
êzingê şewitandinê Lubnan ne bes
e û bona pêşkêşiya şewitandinê
heywanên wê nagihêjin. 17 Li ber

[1] Bişîr in, an jî: Yên hîn guhanê dimêjin.

wî hemû netewe, mîna tunebûnek
in; bona wî ji tunebûnê kêmtir û
tiştê vala tê hesibandin.
18 Wê gavê, ma hûn Xwedê mîna
kî dişibînin? Û kîjan wekhevê
wî bi wî re yek dibînin? 19 Pût,
karkerekî wê rijandiye û zêrvan jî
dora wê bi zêrê ve digire û bona
wê zincîrên zîvînî dirijîne. 20 Zi-
lamê ku hêza wî têra pêşkêşiyekî
wusa nake, darekî ku narize dibi-
jêre; bona ku jê re pûtekî qewartî
yê ku ji cîhê xwe naleqe çêbike,
li karkerekî hosta digere. 21 Ma
we fêhm nekir? Ma we nebihîs-
tin? Ma ji destpêkê ve ji we re
nehate gotin? Ma we ji bingehên
dinê fêhm nekirin? 22 Yê ku li
ser sêla ezmanî rûniştiye ew e û
yên ku di hundirê wê de rûniştine
mîna kulliyan e; yê ku ezmanan
mîna perdayekê dişidîne û bona
rûniştinê wan mîna çadirekê vedi-
ke ew e; 23 yê ku emiran dike tu-
neyek, serwerên dinê mîna tiştekî
vala dike, ew e. 24 Mîna ku qet
nehatine çikandin, mîna ku tu carî
bi erdê ve nehatine çandin, dalîtên
wê, mîna ku reha xwe bi erdê ve
bernedabe ne; hilma wî ji ser wan
ve derbas dibe û hişk dibin, bahoz
jî wan mîna firoyan radihêle û
dibe. 25 Û: Ma hûn ê min mîna
kî bişibînin ku, ez bi wî re yek bi-
bim? Yê Pîroz dibêje. 26 Çavên
xwe berbi jor ve rakin û bibînin,
ka kî vana afirand; ew ku, artêşên
vana bi hejmaran ve derdixîne; bi
navên wan bangî giştikan dike; ji
berya meziniya qudreta xwe û bi
zora hêza xwe yek jî ji wan qet
kêm nabe.
27 Çima ya Aqûp: tu dibêje: XU-
DAN rêya min nabîne û Xwedayê
min li mafê min nanihêre û ya Îs-
raêl, tu çima wusa dibêjî? 28 Ma
te fêhm nekir? Ma te nebihîst?
Xwedayê abadîn, XUDAN, yê
ku nîçikên dinê afirandiye, lawaz
nabe û naweste; gîhaştina kûriti-
ya fêhmkariya wî nabe. 29 Hêzê
dide yê lawaz û qudreta yê ku ji
hîlêt ve ketiye zêde dike. 30 Heta
xort jî lawaz dikevin û diwestin û
egît tilpekî dibin û dikevin; 31 lê
belê yên ku li benda XUDAN in,
hêza xwe teze dikin û mîna qer-
telan baskên xwe vedikin û bilind
dibin; direvin û nawestin; dimeşin
û lawaz nabin.

*Ji XUDAN Ewlekarî*

41 Li ber min hiş bin ya gi-
ravano! Bila gelan jî hêza
xwe teze bikin; nêzîk bibin, wê
gavê bibêjin; em pev re bona da-
razkirinê nêzîk bibin! 2 Ma zi-
lamê ku bi dadiyê bangî ber lingê
xwe kir, ji rojhilatê ve kî rakir ser
pêlan? Gelan dixe ber wî û wî li
ser qiralan dike serwer; wan mîna
tozekî ji şûrê wî re, mîna firoya
ku ba dajo dide kevana wî. 3 Bera
wan dide, ji rêya ku qet gava xwe

neavêtiye bi silametê derbas dibe.
4 Ma ji destpêkê de kî bi bangkiri-
na nifşeyan vêya bikaranî û çêkir?
Ez, XUDAN, tevî yên pêşîn û
dawîn, ez ew im! 5 Giravan dîtin
û tirsiyan; nîçikên dinê dilerizin;
ew nêzîk dibin û tên. 6 Her kes
bi cîranê xwe re alîkariyê dike û
ji birayê xwe re: Bi metirsî be!
dibêje. 7 Û hunermend metirsiyê
dide zêrvan û metirsiyê dide yê
ku bi çakûc li sindana ku rastki-
rinê dixe û bona lehîmê: Qenc bû
dibêje û bona ku nelerize, wê bi
mixan ve dizeximîne.
8 Lê belê tu, ya Îsraêl, qûlê min ê
ku ji nîçikên dinê girtim û ji qun-
cikên wê bangî wî kirim 9 û jê re
gotime: Tu qûlê min î, te bijartim
û te red nekirim, Aqûpê ku bijarti-
me, nîjada dostê min Birahîm, 10
tu metirse, ji ber ku ez bi te re me; li
dora xwe nenihêre, ji ber ku Xwe-
dayê te ez im; ez ê te zexm bikim;
belê, ez ê alî te bikim; belê, ez ê
bi destê rastê dadiya xwe ji te re
bibim alîkar! 11 A vay, hemûyên
ku li dijî te sor bûne, dê bişermin
û rezîl bibin; dê dawekirên te bi-
bin tuneyek û tune bibin! 12 Tuyê
li wan, li yên ku bi te re ketine
keftûleftê bigere û nikaribe bibî-
ne; zilamê li dijî te cengê bi te re
dikin, dê bibin mîna tiştekî tune
ne û mîna ku tiştekî nîn e. 13 Ji ber
ku ez, Xwedayê te XUDAN, ez ê
bi destê te yî rastê bigirim û ji te re
bibêjim: Metirse, ez ê alîkariyê bi
te re bikim! 14 Metirse, ya Aqûp,
kurmê axê û ya gelê Îsraêl, XU-
DAN dibêje; ez ê alîkariyê bi te re
bikim û yê ku te xelas kiriye, Pîro-
zê Îsraêlê ye. 15 A vay, min te kir
cercereyek bênderê ya bi diran, nû
û tûj û yê ku çiyayan bike bênder
û wan hûr bike û giran bike mîna
hûrikên kayê. 16 Tuyê wan ber ba
bike û dê ba jî wan bibe û bahoz
wan belav bike û tuyê bi XUDAN
re kêfxweş bibe. Tuyê bi Pîrozê
Îsraêlê re pesnahiyê bike.
17 Zebûn û xizan li avê digerin û
av nîne û zimanên wan ji tîbûnê
ziwa dibin; ez, XUDAN, ez ê
bersivê bidim wan, ez, Xwedayê
Îsraêlê, ez ê dev ji wan bernedim.
18 Ez ê li ser girên rût çeman û
di hundirê geliyan de çavkaniyan
vekim; ez ê çolê bikim burkê avê
û warê ziwa jî bikim çavkaniyên
avê. 19 Û ez darê erzê, darcêwi-
yê û darê mûtikê û darê zeytûnê
bidim çolê û li beyarê jî serwî,
çinar û şimşîrê pev re biçikînim
ku, 20 bila bibînin û bizanibin û
bifikirin û giştpev re fêhm bikin
ku, destên XUDAN vêya kiriye û
Pîrozê Îsraêlê vê afirandiye.
21 Doza xwe pêş ve bajon, XU-
DAN dibêje; birhanên xwe yî
xwurt derxînin holê, Qiralê Aqûp
dibêje. 22 Bila deynin holê û tiştê
ku dê bibe, bila ji me re bibêjin;
tiştên ku berê çi ne, bigehînin ku

em wan bifikirin û dawiya wan
bighînin; an jî tiştên ku dê werin,
bi me re bidin bihîstin. 23 Tiştên
ku dê paşî vêya werin jî bigehînin
me ku, em bizanibin hûn îlah in!
Belê, qenciyê bikin, an jî xerabiyê
bikin ku, em li dora xwe binihêrin
û gişt pev re bibînin! 24 A vay, hûn
tuneyek in û karê we tiştê tune ye;
yê ku we hilbijêre mekrûh e!
25 Ji bakur ve yekî rakirim ser
pêlan û ew tê; ji rojhilatê ve bangî
navê min dike û mîna ku kûzvan
heriyê dicû, dê began mîna heri-
yê bigire bin lingên xwe. 26 Ma
ji destpêkê kî wî gîhand ku em
bizanibin? Û ji berê de kî gîhand
ku em bibêjin: Rast e? Belê, yê ku
gîhandiye nîne; belê, yê ku dide
bihîstin nîne; belê, yê ku gotinên
we dibihîze nîne! 27 Yê ku pêşiyê
ji Siyonê re: A vay, a vay, ew!
gotiye ez im û ez ê mîzgînîvan
ji Orşelîmê re bişînim! 28 Û di-
nihêrim û kes nîne û di nav wan
de şîretkar nîne ku gava ez bipir-
sim, bila bersivê bide. 29 A vay,
hemûyên wan, karên wan vala û
tune ne; pûtên wanî rijandî bayek
e û valahî ne!

*Qûlê XUDAN*

42 A vay, qûlê min, ê ku ez jê
re bûm alîkar; qûlê min ê
bijartî, ê ku canê min jê razî ye:
Ruhê xwe danîm ser wî; dê bona
gelan, mafê derxîne qadê. 2 Dê
ew neqêre û dengê xwe bilind
neke û wê di kuçê de nede bihîs-
tin. 3 Qamira ku eciqiye neşkîne
û fitîla ku pêketiye netefîne; dê
mafê bigehîne rasteqîniyê. 4 Û li
dinê heta ku mafê bizexmîne, la-
waz nabe û metirsiya wî naşkê û
dê giravan li benda zagona wî bin.
5 XUDAN Xwedayê ku ezmanan
afirandiye û wan belav kiriye û
tiştên ji wan derketine raxistiye; li
ser rûyê erdê hilmê daye netewê;
ruhê daye yê di wî de dimeşin,
wusa dibêje: 6 Ez, XUDAN, bi
rastiyê bangî te kirim û ez ê bi
destê te bigirim û te biparêzim 7 û
bona ku tu çavên kor veke û girti-
yan ji zindanê û yên ku di tariyê
de rûdinin ji girtîgehê derxîne, ez
ê te ji neteweyê re bi peymanî, ji
gelan re bi ronahîbûnê bidim. 8 Ez
XUDAN im, navê min ew e û ez ê
rûmeta xwe nedim yekî din û pes-
nê xwe nedim pûtên qewartî. 9 A
vay, yên berê bûn û yên nû ez di-
gihînim; berî ku ew derkevin holê,
ez ji we re didim bihîstin.

*Qesîdeya Pesndayînê*

10 Yên ku dakevin behrê û heçi-
yên ku di hundirê wê de ne, gira-
van û yên ku di wan de rûdinin,
ji XUDAN re qesîdeyek nû û ji
nîçikê erdê ve pesna wî bistirên!
11 Çol û bajarên wî, gundên ku
Kedar lê rûdine, bila dengên xwe
bilind bikin; yên ku li Selayê rû-

dinin, bila bistirên, ji şaxên çiya-
yan biqêrîn! 12 Bila mezinahiyê
bidin XUDAN û yên ku li girava
rûdinin bila pesna wî bighînin. 13
Dê XUDAN mîna egîdekî derke-
ve; mîna zilamê cengê xîreta xwe
hişyar bike; dê bang bike, belê,
dê bi dengekî bilind bang bike; li
hember neyarên xwe dê egîdiyan
çêbike.
14 Ji demekî dirêj ve ez bêdeng
mam; bêdeng mam û bi xwe gir-
tim; lê niha ez ê mîna pîreka ku
biwelidîne biqêrim; hilmê qut qut
bigirim û him jî helkehelk bikim.
15 Ez ê çiya û giran xera bikim û
hemû hêşinahiyên wan hişk bikim
û ez ê çeman bikim giravan û bur-
kan ziwa bikim. 16 Û ez ê koran,
ji rêyekî ku nizanin ve bînim; di
rêyên ku nizanin de, ez ê ji wan re
bibim rêber; ez ê tariyê di pêşiya
wan de bikim ronahî û cîhên xwar
jî rast bikim. Ez ê van tiştan bikim
û wan bernedim. 17 Yên ku bi
pûtên qewartî ewle dibin, yên ku
ji pûtên rijandî re: Hûn îlahên me
ne! dibêjin, dê şûnda bên vege-
randin, dê zehf şermezar bibin!

*Îsraêl ji bo Gotina Xwedê kerr û kor e*

Met 13,9-15; Yû 9,39-41

18 Ya kerrno, bibihîzin! Û ya kor-
no, bona nêrînê binihêrin! 19 Ma
xeynî qûlê min, yê ku kor e kî ye?
An jî kî ye yê mîna şandiyê min
kerr e? Mîna yê ku bi min re aşît e
kor û yê mîna qûlê XUDAN kor e
kî ye? 20 Tu pirr tiştî dibînî, lê belê
tu bi balkêşî nanihêre; guhên wî
vekirîne, lê belê nabihîze. 21 Ji ber
dadiya xwe, zagonê mezin kirin û
wê bilindtir kirin XUDAN xoşnûd
kir. 22 Lê belê ev netewe, netewe-
yek hatiye tazîkirin û talanbûyî
ye; gişt di qulikan de hatine girtin
û di girtîgehan de hatine girtin;
ew bona talankirinê ne û xelasker
nîne; bona şêlandinê ne û yekî ku:
Şunda bide! bibêje nîne.
23 Di nava we de kî heye ku, bila
guh bide vêya û di dema ku were
de qenc guhdarî bike û bibihîze?
24 Ma kî bona talankirinê Aqûp
û bo şêlandinê Îsraêl da? Ma ne
XUDAN e? Ew XUDANê ku
me li dijî wî sûc kirin û nexwes-
tin ku di rêyên wî de bimeşin û
zagona wî guhdarî nekirin. 25 Û
xeyda hêrsa xwe û zora cengê li
ser wî ve rijand û dor bi dor wî
bi pêtan ve dagirt; lê belê wî ne-
zaniya û wî şewitand, lê belê wî
nexist dilê xwe.

*Xelaskerê tekane yê Îsraêlê XUDAN e*

43 Û niha, ya Aqûp, yê ku
te afirandiye û ya Îsraêl,
XUDANê ku şikil daye te wusa
dibêje: Metirse, ji ber ku te bi fid-
yê ve xelas kirim! Bi navê te bangî
te kirim, tu yê min î. 2 Dema tu
di nav avê de derbas bibe, ez ê bi
te re bim û dema tu di nava çe-

man de derbas bibe, dê di ser te
ve neçin; gava tu di nava agir de
bimeşe, tuyê neşewite û dê pêt te
neşewitîne. 3 Ji ber ku Xwedayê
te, Pîrozê Îsraêlê, Xelaskerê te,
XUDAN ez im! Bi fidya te Misirê,
li dêvla te welatê Hebeşê û Sebayê
dam. 4 Ji ber ku tu di çavê min de
birûmet û birêz î û ji ber ku ez ji
te hez dikim, ez ê dêvla te zilaman
û li dêvla canê te gelan bidim. 5
Metirse; ji ber ku ez bi te re me,
ez ê nîjada te ji rojhilatê ve bînim
û ez ê te ji rojavayê ve bidim hev.
6 Ez ê ji bakur re bibêjim: Bide!
Û ji başûr re: Negire! bibêjim û ez
ê lawên min ji dûr ve û qîzên min
ji nîçika erdê ve 7 û her zilamê ku
bona mezintiya xwe afirandime
û şikil dame, belê, her zilamê ku
afirandime û bi navê min ve tên
bang kirin bîne! bibêjim.
8 Netewa ku çavên wê kor in û
kerrên ku guhên wan hene der-
xîne! 9 Bila hemû netewe bên
cem hev û gel bicivin; ma di nav
wan de kî dikare vêya bigihîne û
tiştên berê nîşanî me bide? Bila
şahdeyên xwe bînin ku mafê
qezenc bikin; ya na bila guhdarî
bikin ku: Rast e! bibêjin. 10 XU-
DAN dibêje: Hûn şahdeyên min
û qûlên ku bijartime ne. Da ku,
hûn bizanibin û baweriya xwe
bi min ve bînin û fêhm bikin ku
ew ez im. Berî min Xwedê nebû
û paşî min jî nabe. 11 Ez, ez XU-
DAN im û xeynî min wekî din
xelasker nîne. 12 Min gîhand û
min xelas kir û min da bihîstin û
di nav we de îlahên biyan nîne û
hûn şahdeyên min in, XUDAN
dibêje û ez Xwedê me. 13 Belê,
ji cergî roj bûye ez ew im û yekî
ku ji destên min xelas bike nîne;
ez bikar tînim û ma kî dikare bibe
asteng?

*Ji Babîlê Xelasbûn*

14 XUDAN, Xelaskerê we, Pîro-
zê Îsraêlê wusa dibêje: Di oxra we
de şandim Babîlê û di keştiyên ku
li ser sitirandine de, ez ê Kildani-
yan, bi revokbûnê giştikî pev re
daxînim. 15 Pîrozê we, Afirînerê
Îsraêlê, Qiralê we, XUDAN ez im.
16 XUDANê ku di behrê de rêgeh û
di avên xwurt de rê vedike; 17 ere-
ba cengê û hespê û artêşê û yê egîd,
ew pev re radikevin, dê ranebin; ew
hatin dewisandin, mîna fitîlê tefiyan
derdixe, wusa dibêje: 18 Tiştên berê
di bîr de neynin û tiştên kevn nefi-
kirin! 19 A vay, ez tiştekî nû dikim;
dê niha derkeve holê; ma qey hûn
ê wê fêhm nekin? Heta ez ê li çolê
rê û li cîhê ziwa çeman çêbikim.
20 Heywanên beyarê, çeqal û
heştirme dê mezintiyê bidin min;
ji ber, ez ê bona ku bi netewa xwe,
netewa xwe ya bijartî ve bidim ve-
xwarin, li çolê av, li cîhên ziwa jî
çeman bidim, 21 ew netewa ku,
bona pesna min bînin zimên, wê

bona xwe afirandim.
22 Tevî ku wusa ye jî, te bangî
min nekir ya Aqûp; lê tu ji min
aciz bû, ya Îsraêl! 23 Te bona
pêşkêşiyên şewitandinê, ji mîhên
xwe, ji min re neanî û te bi qur-
banên xwe mezinahiyê neda min.
Min te bi pêşkêşiyên nan ve mijûl
nekir û bi gunukê ve aciz nekir.
24 Te bona min pere û qamira
bêhnxweş nestend û bi rûnê qur-
banên xwe ve te min têr nekir. Lê
tenê te bi sûcên xwe min da mijûl
kirinê û bi fesadiyên xwe te min
aciz kir!
25 Ez, ez ê ku di oxra xwe de yê
gunehên te paqij kiriye me û ez ê
sûcên te di bîra xwe de neynim.
26 Di bîra min de bîne; em pev
re bên daraz kirin; doza xwe bêje
ku tu mafê bi dest ve bixe! 27 Yê
pêşiyê avêt sûc kir û mamosteyên
te li dijî min gunehê kirin. 28 Ji
ber vêya ez ê serokên cîhê pîroz
mindar bikim û Aqûp bidim na-
letê û Îsraêl jî bidim rezîltiyê.

*Dê XUDAN Ruhê xwe di ser Îsraêl de birijîne*

Hêz 36,24-30; Yow 3,1-5; Zek 2,10-11

44 Û niha ya qûlê min Aqûp
û Îsraêla ku bijartime,
guhdarî bike! 2 XUDANê ku te
afirandiye û ji rehmê ve şikil daye
te û yê ku dê alîkariyê bi te re bike,
wusa dibêje: Metirse ya qûlê min
Aqûp û tu, ya Yeşûrûnê ku bijar-
time! 3 Ji ber ku ez ê avan bi ser
yê ku tî bûye û lehiyan bi ser axa
ziwa ve birijînim; ez ê Ruhê xwe
bi ser nîjada te û ji yên ku dê ji
te derkevin re bereketa xwe biri-
jînim. 4 Û dê ji nava gîhayan, li
qeraxa avên ku diherikin, dê mîna
darên biyê qam bidin[1]. 5 Dê yek:
Ez qûlê XUDAN im! bibêje; dê
yekî din jî navê Aqûp li xwe bike;
dê yekî din jî li destê xwe; ez qûlê
XUDAN im! binivîse û dê navê
Îsraêl li xwe bike.
6 XUDAN, Qiralê Îsraêlê û Xelas-
kerê wê, XUDANê artêşan wusa
dibêje: Pêşî ez im û dawî ez im û
xeynî min Xwedê nîne. 7 Û ji cer-
gî netewa kevin afirandim, ma kî
heye ku mîna min bang bike? Bila
vêya bighîne û li ber min rêz bike
û bila tiştên ku dê werin û tiştên
ku dê bibin bighînin. 8 Bêzar
nebin û metirsin! Ma ji demên
berê de min bi te nedan bihîstin û
negîhand? Û hûn şahdeyê min in.
Ma xeynî min Xwedê heye? Belê,
Zinarek din nîne; ez nizanim.

*Dê yên Pûtperest şermezar bibin*

9 Giştikên ku şiklê didin pûtê qe-
wartî, zilamên vala ne û tiştên ku
jê zewqê digirin, dê ji tu karî re
nebe û bona ku heta şahdeyên wan

1 Hêşin bibin, ji nişka ve derkevin; an jî: Mezin bibin.

jî bête şermezar kirin nabînin û ni-
zanin. 10 Ma kî şiklekî da îlahekî,
an jî pûtekî ku ji tiştekî re nabe ri-
jand? 11 A vay, dê hemû hevalên
wî bên şermezar kirin û yên kar-
ker jî, ew ji mirovan in; bila gişt
bicivin, rabin ser pêlan; dê bêzar
bibin, pev re bên şermezar kirin!
12 Hesinkar bivirê çêdike û di
agirê komirê de dixebite û bi çakû-
can şikil dide wê û bi bazûyên xwe
yî xwurt wê bikar tîne; belê, birçî
dibe û hêza wî namîne; avê ve-
naxwe û lawaz dikeve. 13 Xerrat
ta dişidîne; bi pênûskê xet li ser
dike, bi xerratokan şikil dide wê û
bi pergelê xetê li ser çêdike û bona
ku li malê rûne, wê li gor şiklê mi-
rov û li gor xweşikiya mirov çêdi-
ke. 14 Bona xwe darên erzê jêdike
û darê palûtê û darçiloyê radihêje
û ji nava darên daristanê de bona
xwe darekî dibijêre; darê çamê
diçikîne û baran wê mezin dike. 15
Û ji mirov re, bona agir vêxistinê
qenc e û ji wê distîne û germ dibe;
belê, wê pêdixe û nan çêdike; belê,
îlahekî çêdike û ji wî re peristinê
dike; wî dike pûtekî qewartî û li
ber wî xwe davêje erdê[1]. 16 Pa-
riyek wê di agir de dişewitîne; bi
pariyek wê ve goşt dixwe, kebabê[2]
çêdike û têr dibe; belê, germ dibe û
dibêje: Ox! germ bûm, agir dîtim.
17 Û yê ku ji ber mayiye ji xwe
re dike îlah, pûtekî qewartî û li ber
wê secde dike û peristinê dike û li
ber wê digere û dibêje: Min xelas
bike; ji ber ku îlahê min tu yî!
18 Nizanin û fêhm nakin; ji ber,
bona ku nebînin çavên wan, bona
ku fêhm nekin dilên wan girtin.
19 Û nayne qet ser fikrek xwe
jî, zanîn û fêhmkarî nîne ku bi-
bêjî: Min pariyek wê di agir de
şewitand, belê, li ser pêtên wê
nan jî çêkirim; goşt kirim kebab
û xwarim û ma yê ku ji ber mayi-
ye ez bikim tiştekî mekrûh? Ma
ez li ber dalîta darê secde bikim?
20 Xweliyê dixwe; dilê xapandî
wî çewt kiriye û nikare canê xwe
xelas bike û nikare bibêje: Ma
tiştê ku di destê minî rast de ye,
ne tiştekî derewîn e?

*XUDAN Afirker û Xelasker e*

21 Van tiştan di bîra xwe de bîne,
ya Aqûp û ya Îsraêl; ji ber ku qûlê
min tu yî; min şiklê da te; qûlê
min tu yî; ya Îsraêl, tu ji aliyê min
ve nayê bîrkirinê! 22 Min gu-
nehên te mîna ewra reş û sûcên te
mîna ewrê paqij kir; vegere min;
ji ber ku te bi fidyê xelas kirim!
23 Bistirên, ya ezmanan! ji ber
ku XUDAN vêya kir; biqêrin, ya
hûn, kûritiyên erdê! ya çiyano, ya
daristan û her darê ku di wê de
ye! dest bi sitranê bikin; ji ber ku

1 Pê re secde dike.

2 Biraşte.

XUDAN, bi fîdyê ve Aqûp xelas
kir û dê di Îsraêlê de mezinahiyê
bibîne.
24 XUDANê ku te bi fîdyê ve xe-
las kiriye û di rehmê de şikil daye
te wusa dibêje: XUDANê ku her
tiştî afirandiye, tena xwe ezma-
nan belav kiriye, erdê raxistiye,
25 ê ku nîşanên derewînan vala
derxistiye û remildaran dîn kiri-
ye, yê ku zaniyaran vegerandiye
û zanîna wan kiriye bêaqilî, 26 ê
ku gotina qûlê xwe zeximandiye
û şîreta şandiyê xwe aniye serî,
ê ku bona Orşelîmê: Dê di hun-
dirê wê de bête rûniştin! û bona
bajarên Cihûda: Dê bên ava ki-
rin û ez ê wêranxaneyên wê dîsa
ava bikim! gotiye; 27 ji balûpalê
re: Ziwa bibe û ez ê çemên te bi-
dim herikandin! gotiye 28 û ê ku
bona Koreşê: Şivanê min e û dê
hemû mirazê min bîne cîh, goti-
ye û bona Orşelîmê: Dê were ava
kirin! Û bona perestgehê: Dê bin-
geha te bête kolan[1]! gotiye, XU-
DAN ez im.

*XUDAN Koreş dişîne*

45 XUDAN ji Koreşê ku bona
li ber min serê netewan
xwar bike û piştên qiralan sist bike
û bona ku derî neyên girtin, li ber
wî, bona vekirina perên[2] deriyê, bi
destê wî ve girtî ye, ji mesîhê xwe
re wusa dibêje: 2 Ez, ez ê di pêşiya
te de bimeşim û cîhên bi nîçik ser-
rast bikim; ez ê perên deriyên tûnc
bişkînim û zendên wanî hesinî
perçe bikim 3 û bona ku tu bizani-
be, XUDANê ku bi navê te bangî
te dike, Xwedayê Îsraêlê ez im;
ez ê xezîneyên tariyê û xezîneyê
veşartî ên cîhên dizî, bidim te. 4
Hîn berî ku tu min nas bikî, bona
qûlê xwe Aqûp û Îsraêlê ku bijar-
time, bi navê te bangî te kirim;
nav li te kirim. 5 XUDAN ez im
û wekî din nîne; xeynî min Xwedê
nîne. Hîn berî ku tu min nas bikî,
nifşeyê bi te girê dam ku, 6 bila
yên ji rojhilat û rojavayê bizanibin
ku xeynî min nîne; XUDAN ez im
û wekî din nîne. 7 Yê ku şiklê dide
ronahiyê û tariyê diafirîne; yê ku
aşîtvaniyê dike û asîwan diafirîne,
XUDANê ku vana hemûyan dike
ez im.
8 Ya ezmanino, ji jor ve bidin
dilopkirin û bila ewr rastiyê bi-
herikînin! Bila ax vebin û mêwa
xelasiyê bidin! Bila tevî wê ji erdê
ve aşitiyê, hezkirinê û baweriyê
bidin! Ez, XUDAN, min vana
afirand.

*XUDAN Xwedayê Tekane ye*

9 Wey li serê kesê ku bi yê şikil
daye wî re dikeve keftûleftê! Di
nava perçên sihûnê de ê ku li erdê

1 Bête vekirin, an jî: Bête avêtin.
2 Qanat.

ye, pariyekî sihûnê! Ma herî ji yê
ku şikil didê re dibêje: Tu çi dikî?
an jî; karê destê te ji te re: Destê
wî nîne, dikare bibêje? 10 Wey
li halê wî kesê ku; ji bav re: Te
çi aniye dinê? an jî ji pîrekê re:
Te tiştekî çi celebî welidandiye?
dibêje re!
11 Pîrozê Îsraêl û XUDANê ku
şikil daye wî wusa dibêje: Tiştên
ku dê werin, ji min bipirsin; bona
lawên min û bona karê destên min,
bila ji min re bihêlin[1]! 12 Min dinê
çêkir û li ser wê mirovan afirand;
destên min ezmanan belav kir
û emir dam hemû artêşên wan.
13 Min, wî bi maf rakir ser pêlan û
ez ê hemû rêyên wî rast bikim; dê
ew ê bajarê min ava bike û sirgûnên
min bêyî stendina berdêl û xelatan
berde, XUDANê artêşan dibêje.
14 XUDAN wusa dibêje: Dê keda
Misirê û bajarê Hebeşê û danû-
stendina Şebayiyên qam dirêj
derbasî te bibin û bibin yên te; dê
ew zilaman li pêy te bimeşin; dê
di nava zincîran de derbas bibin
û li ber te xwe bavêjin erdê, dê li
ber te bigerin û bibêjin: Bi rastî
Xwedê di nav te de ye û wekî din,
Xwedayekî din nîne! 15 Bi rastî
Xwedayê ku xwe vedişêre tu yî,
ya Xwedayê Îsraêlê, ya Xelasker!
16 Dê gişt bên şermezar kirin û
him jî rezîl bibin; heçiyên ku pût
çêdikin, dê pev re herin rezîltiyê.
17 Lê belê, dê Îsraêl bi destê XU-
DAN ve, bi xelasiya abadîn ve
xelas bibe; hûn ê di heta bi hetayê
de neyên şermezar kirin û rezîl
nebin.
18 Ji ber, XUDANê ku ezmanan
afirandiye, Xwedayê ku şikil daye
dinê û wê afirandiye, wê zeximan-
diye û wê li valahiyê neafirandiye,
bona ku li ser wê bête rûniştin wê
afirandiye, wusa dibêje: XUDAN
ez im û wekî din nîne! 19 Min di
veşartiyê de, li derekî di warê ta-
riyê de negot; ji nifşeya Aqûp re:
Min li valahiyê bigerin negot; ez,
XUDAN, yê ku heq dibêje, tiştê
rast digihîne, ez im.
20 Ya hûn, ên ku ji netewan re-
viyane û xelas bûne, bicivin û
werin; pev re nêzîk bibin; zanîna
kesên ku êzingên pûtên qewartî
dikişînin û zaniyariya kesên li ber
îlahê ku nikare xelas bike digerin
nîne. 21 Bigehînin û nêzîk bikin;
belê, bila pev re bişêwirin! Ma
yê ji berê ve vêya dide bihîstin kî
ye? Ez, XUDAN, ma ne ez im?
Û xeynî min Xwedê, Xwedayê
heq û Xelasker nîne; xeynî min
kes nîne! 22 Ya nîçikên dinê, hûn
gişt berî bidin min û xelas bibin!
Ji ber ku Xwedê ez im û xeynî
min kes nîne. 23 Ji xwe re sondê
xwarim; gotina: Dê her çong bona
min xwar bibe, her ziman ji min
re sondê bixwe, gotin bi rastiyê ji

[1] An jî: Bila emirê ji min re bikin.

devê min ve derket û şunda vena-
gere! 24 Dê bona min wusa bête
gotin: Rastî û qudret tenê di XU-
DAN de ye! Dê mirov werin wî û
hemûyên ku li dijî wî sor bûne, dê
bên şermezar kirin. 25 Dê hemû
nîjada Îsraêl, di XUDAN de bêsûc
bin û pesnahiyê bidin.

*Dawiya Pûtên Babîlê*

Yêr 50,2; 10,1-15

46 Bel dirûxe, Nebo xwar
dibe; pûtên wan li ser
heywanan û li ser bergîran; wan
tiştên ku hûn dikşînin bûn girani-
yek, ji heywanê westiyayî re bû
bar. 2 Xwar dibin, pev re dirûxin;
hêz negîhandin ku bar xelas bikin
û ew bi xwe jî çûn sirgûnê.
3 Ya mala Aqûp û hemûyên ku li
pêy mala Îsraêl ve mayîne, hûn,
yên ji dema ku hûn hîn di zikê
dayikê de bûn, hilgirtime û biri-
me û ji dema ku hûn hîn di rehmê
de bûn we dikişînim, min guhdarî
bikin! 4 Heta kalepîrbûna we jî
ez ew im û heta ku porên we sipî
bibin, ez ê we hilgirim; min vêya
kir û ez ê bikişînim; belê, ez ê hil-
girim û xelas bikim. 5 Ma hûn ê
min wekî kê bişibînin û bi kî re
wekhev bigirin û hûn ê bona min
çi mînak çêbikin ku em wekhev
bikin? 6 Yên ku zêr ji kîsê vala di-
kin û yên ku zîvê di pîvanokê de
diwezînin, bi heqdestî zêrkeran
digirin û ew jî ji vêya îlahekî çê-
dike; li ber secde dikin û peristinê
jê re dikin. 7 Wî di pişta xwe de
dikişînin û dibin û datînin cîhê wî
û li ser pêlan disekine; ji cîhê xwe
naleqe; erê, yek jê re biqîre nikare
bersivê bidê û nikare wî ji tenga-
siya wî ve xelas bike.
8 Vêya di bîra xwe de bînin û
mêrxas bibin; ya yên ku gunehan
dikin, vêya dîsa têxin dilên xwe!
9 Tiştên berê, ên ku ji dema kevn
in, di bîra xwe de bînin, ji ber ku
Xwedê ez im û wekî din nîne; ez
Xwedê me û wekî min nîne; 10 yê
ku dawiyê ji pêşiyê ve û tiştên ku
hîn nebûne ji berê ve dighîne; bi
gotina: Dê şîreta min bisekine û
ez ê hemû miradê xwe bînim cîh,
11 yê ku ji rojhilatê û ji warê dûr
ve bangî zilamê ku dê şîreta min
bike kiriye, ez im; belê, min got û
ez ê bînim cîh; min pêşniyar kir û
ez ê wê bikim.
12 Dilhişkno, ên ku ji dadiyê dûr
in! Min guhdarî bikin: 13 Ez da-
diya xwe nêzîk dikim, ne li dûra
yî û dê xelaskirina min dereng
nemîne; ez ê li Siyonê xelasiyê û
bona Îsraêl xweşikya xwe bidim.

*Têkçûna Babîlê*

47 Ya tu, qîza Babîlê ya bakîr,
dakeve jêrîn û li axê rûne!
Ya qîza Kildaniyan! text nîne, li
erdê rûnê; ji ber ku dê êdî ji te re
nebêjin nazik û nazlî. 2 Du kevirê
aşê rahêle û arvan bihêre; pêçika

xwe veke, dawa xwe rake, teşkên
xwe veke, ji çeman derbas bibe.
3 Dê tazîbûna te vebe, belê, dê
şermezariya te bête xuyanî kirin!
Ez ê tolê hildim û tu kesî neparê-
zim! 4 Xelaskerê me, XUDANê
artêşan navê wî, Pîrozê Îsraêlê
ye! 5 Ya qîza Kildaniyan, bêdeng
rûnê û bikeve tariyê! Ji ber ku, dê
êdî ji te re nebêjin: Qiralîça wela-
tan. 6 Ez ji netewa xwe ve hêrs
bûm, mêrasa xwe mindar kirim û
wan dam destê te; te dilovaniyê li
wan nekir; te li ser yê kalepîr nîr-
xê xwe zehf giran kir. 7 Û te go-
tibû: Ez ê abadîn bibim qiralîçe!
Ewqas ku, te van tiştan neanî bîra
xwe û dawiya vêya nefikirî.
8 Ya zebûnê zewqê, tu ku, di ew-
lekariyê de rûdinî û di dilê xwe
de: Ez heme û xeynî min kes
nîne! Ez ê bi biyitî rûnenim, êşa
zarokan nebînim! dibêjî. Niha
vêya guhdarî bike: 9 Dê êşa zaro-
kan û biyitî, her du jî di rojekê de
werin serê te; çawa ku afsûnîtiya
te zêde û sêrbaziyên te pirr in, dê
vana dîsa jî bi hêzek giran werin
serê te. 10 Ji ber ku tu bi xerabiya
xwe ve ewle bû; te got: Kesê ku
bibîne nîne; zaniyarî û zanîna te,
te şaş kirin û di dilê xwe de te: Ez
heme û xeynî min kes nîne! got.
11 Lê ji ber vêya, dê asîw were
serê te û tuyê nizanibe ku, ka ew
ê kengê were; dê bêtar bikeve
serê te; tuyê nikaribe wê bavêje
û têkçûna ku tu nizanî dê nişka ve
were ser te.
12 Tu niha, bi sêhrên xwe yî te ji
zarokantiya xwe ve zehf kedê dayi-
ye û bi pirr afsûnên xwe bisekine;
dibe ku tu qenciyê bibîne, dibe ku
tu serfiraz bibe! 13 Tû ji zêdeyiya
şîretên ku te stendine westiyayî;
munecim, sitêrknas, ên ku dê li
serê mehê çi bibe, dighînin, bila
niha rabin û te ji tiştên ku dê werin
serê te xelas bikin! 14 A vay, ew
ê bibin mîna firêzê; dê agir wan
bişewitîne; dê nikaribin canên xwe
ji destê pêtan xelas bikin, dê ev
agir, ne bona germbûnê bibe pêt û
ne jî bibe agirê ku mirov li ber wê
rûne. 15 Tiştên ku te kedê dayiye,
dê wusa bibin; her kesên ku ji za-
rokantiya te de bi te re danûsten-
dinê dikin, dê di rêya welatê xwe
de bibin eware; dê kesî ku te xelas
bike tune be!

*Inyada Îsraêlê*

48 Ya mala Aqûp! Hûn ku,
bi navê Îsraêl ve tên bang
kirin û hûn ji avên Cihûda ve der-
ketin, hûn bêyî rastî û rasteqîniyê,
bi navê XUDAN ve sondê dixwin
û Xwedayê Îsraêlê di bîra xwe de
tînin; 2 ji ber ku ew dibêjin; em
ji bajarê pîroz in û xwe disipêrin
Xwedayê Îsraêlê, ê ku navê wî
XUDANê artêşa ye, vêya guhdarî
bikin! 3 Tiştên berê, ji demên kevn
ve gîhandim; belê, ji devê min ve

derketin û wan dam bihîstin; wan
nişka ve çêkirim û ew bûn. 4 Ji
ber ku dizanîbûm tu bi inyad î û
histuyê te reha hesin û eniya te
ji tûncê yî, 5 ji dema kevn de wê
gîhandim te, berî ku bibe, ji te re
dam bihîstin; ya na te yê bigota:
Ê ku wan kirine pûtê min e, ên ku
emir dide wan pûtê min ê qewartî
û pûtê min ê rijandî ne. 6 Te vêya
bihîst, binêre, gişt bûn û ma hûn ê
qey neynin zimên? Ji niha ve min
tiştên nû, tiştên ku tu nizanî bi te
re dan bihîstin. 7 Ew ne ji demên
kevin, niha hatin afirandin; te
berî vê roja wan nebihîstibû; ya
na te yê: Ez bi wan dizanim, bi-
gota. 8 Belê, te nebihîst, belê, te
nizanîbû; belê, ji demên kevin ve
guhê te venebû; ji ber, dizanîbûm
ku te zehf xayîntiyê dikir û hîn di
rehma dayikê de ji te re gunehkar
dihat gotin. 9 Ez ji ber navê xwe,
hêrsa xwe bi derengiyê ve dixim
û ji ber pesnahiya xwe, bona ku
te jênekim û nevêjim, bo qenciya
te ez xwe pê digirim. 10 A vay, te
safî kirim, lê belê ne mîna zîv; te
di ocaxa tengasiyê de ceribandim.
11 Ez ê vêya bona xwe, bona xwe
bikim; ji ber ku, ma dê çima bêrû-
metî ji navê min re bête kirin? Ez
mezintiya xwe nadim kesekî din.

*Dê Îsraêl Xelas bibe*

12 Ya Aqûp û Îsraêlê ku bang kiri-
me, min guhdarî bike! Ez ew im;
pêşî ez im, dawî jî ez im. 13 Belê,
destê min bingeha erdê danî û
destê minî rastê ezmanan belav
kir; dema ez bangî wan bikim, pev
re radibin û disekinin. 14 Hûn gişt
bicivin û guhdarî bikin! Ma di nav
wan de van tiştan kî gîhandin? Zi-
lamê ku XUDAN jê hez dike, dê
tiştê ku wî kiriye miraz ji Babîlê re
bike û dê bazûya wî li ser Kildani-
yan be. 15 Min, min got; belê, min
bangî wî kir, wî anîm û dê rêya wî
serfiraz be. 16 Nêzîkî min werin,
vêya guhdarî bikin! Ji destpêkê ve
bi dizîka negotim; ji cergî bûyiye
ez li wir im û niha Xudan, XU-
DAN û Ruhê wî min şand.
17 XUDAN, Pîrozê Îsraêlê yê ku
te bi fîdyê ve xelas kiriye wusa
dibêje: XUDAN Xwedayê te, ê
ku tiştê qenc fêrî te kiriye, di rêya
ku tuyê bimeşe de te ajotiye ez
im. 18 Xwezîka te emirên min
baş guhdarî bikira! Dê wê gava
selameta te mîna çem û baweriya
te mîna lehiyên behrê bibûya 19 û
dê nîjada te mîna qûmê û yên ku
ji nîjada te derketine bibûna mîna
hebên wê; ji ber min navê wî ne-
dihat jêkirin û avêtin û dê helaq
nebûna.
20 Ji Babîlê derkevin; ji Kildani-
yan birevin; bi dengê sitirandinê
bighînin, vêya bidin bihîstinê;
wî heta nîçikê erdê derxînin! bi-
bêjin: XUDAN qûlê xwe Aqûp
bi fîdyê ve xelas kir. 21 Û dema

wan di çolê de da meşandin, tî
nebûn; bona wan ji zinarê ve avê
herikand û zinarê qelişand û av
pijiqîn. 22 XUDAN dibêje: Ji xe-
raban re aştî nîne!

*Wezîfeya Qûlê XUDAN*
Îşa 61,11-4

49 Ya giravano, min bibihîzin
û neteweyên ku li dûra ne,
qenc guhdarî bikin! Hîn ez di reh-
ma dayika xwe de bûm, XUDAN
bangî min kir; dema ez di zikê
dayika xwe de bûm, navê min got
2 û devê min kir mîna şûrekî tûj;
di siya destê xwe de min veşart
û min kir mîna tîrekî bi sîqal û di
tîrdanka xwe de min veşart 3 û ji
min re got: Ez ê di te de mezintiyê
bibînim, tu Îsraîl î, qûlê min î. 4 Lê
belê min got: Min li valahiyê kedê
da, quweta xwe li valahiyê û bey-
hûde xerc kirim; lê belê mafê min
li cem XUDAN e û heqdestê min li
cem Xwedayê min e.
5 Û niha bona ku Îsraêl ji XU-
DAN re bicive, ji bo ku Aqûp
dîsa ji wî re bînim, XUDANê ku
bona min ji xwe re bike qûl; – ji
ber ku di çavê XUDAN de rûmetê
dîtim û Xwedayê min ji min re
bû hêz –, yê ku hîn ji rehmê ve
şikil daye min dibêje, 6 belê, ew
dibêje: Bona nîjadên Aqûp, ji nû
ve deyne cîhên wan û bona şunda
anîna parastiyên Îsraêlê, ji min re
qûlbûna te tiştek nîne; ez ê te ji
gelan re jî bi şewlebûnê bidim ku,
tu heta nîçikê erdê bibe xelasiya
min! 7 Xelasker û Pîrozê Îsraêlê
XUDAN, ji zilamê ku mirov wî
biçûk dibînin, gel jê dikerihin û
bi xwe dîlê serwera yî re wusa
dibêje: Ji ber XUDANê ku dilsoz
e, Xelasker û Pîrozê Îsraêlê ku te
bijartiye, dê qiral bibînin û rabin
ser pêlan; dê serok bibînin û sec-
de bikin.
8 XUDAN wusa dibêje: Di dema
razîbûnê de bersivê dam te û di roja
xelasiyê de alîkariyê bi te re kirim
û ez ê te biparêzim û ez ê te bi pey-
manî bidim netewê ku, tu welat
bizexminî, mêrasên ku bêkes mane
par bikî; 9 ji girtiyan re: Derkevin!
ji yên ku di tariyê de ne re: Werin
ronahiyê! bibêjî. Dê ew di rêyan
de biçêrin, dê di hemû girên rût de
mêrgên wan hebin. 10 Dê birçî ne-
bin û tî nebin; dê germ û roj li wan
nekevin; ji ber ku yê dilovaniyê li
wan bike, dê rê nîşanî wan bide û
wan bighîne çavkaniyên avê. 11 Û
ez ê hemû çiyayên xwe bikim rê û
dê rêyên min ên mezin bilind bibin.
12 A vay, dê ev ji dûr ve û a vay,
dê ev ji bakur ve û ji rojavayê ve
û ev jî dê ji warê Sînimê ve werin.
13 Ya ezmanno, bistirên û ya erd,
bi kêfxweşiyê ve bicoşe û ya çiya-
no, dest bi sitranê bikin! ji ber ku
XUDAN xema netewa xwe revand
û dilê wî bi yên ku bi keser in ve
şewitî.

14 Lê belê Siyonê got: XUDAN
min hişt û Xudan min ji bîr kir.
15 Ma pîrek dikare ku lawê xwe
yî bimemik ve ji bîr bike ku, dilê
wê bi xwe li zarokê rehma wê
neşewite? Belê, ew dikarin ji bîr
bikin, lê belê ez te ji bîr nakim!
16 A vay, min te li her du kefên
destên xwe neqişand; dîwarên te
her tim li ber min in. 17 Lawên
te diteqizin û tên; yên ku te helaq
dikin û yên ku te wêran dikin, dê
ji hundirê te ve derkevin! 18 Dor
bi dor çavên xwe rake û binêre;
ew gişt dicivin, tên cem te. XU-
DAN dibêje: Bi heqê hebûna min
tuyê wan giştikî, mîna xemlekê
li xwe bike û tuyê mîna bûkekê
wan li xwe girê bide. 19 Ji ber
ku cîhên te yê wêran û bêkes û
warê te yê ku hatiye xerabe kirin,
bi rastî tuyê bona yên ku niha rû-
dinin teng bibe û yên ku te dadi-
qurtînin, dê bi dûr bikevin. 20 Dê
guhên te, gotinên lawên dema ku
tu bê law dimîne: Ev cîh ji min re
teng tê, cîh bide min, ku ez rûnim
bibêje, bibihîzin! 21 Û wê gavê
tuyê di hundirê xwe de bibêje:
Ez ji zarokên xwe bûm, tena serê
xwe, sirgûn û li wir û vir digerîm,
kî vana ji min re peyde kirin? Û
kî vana mezin kirin? A vay, ez
tenê mabûm; vana, li ku derê bûn
vana?
22 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
A vay, ez ê destê xwe ji gelan re
rakim û ala xwe ji neteweyan re
bilind bikim û dê lawên te di him-
bêzên xwe de bînin û qîzên te di
pişta xwe de bikşînin. 23 Û dê qi-
ral ji te re bibin kalik û qiralîçeyên
wan ji te re bibin pîrik; dê xwe ba-
vêjin erdê û tozên lingê te bialêsin
û tuyê bizanibe ku XUDAN ez im
û yên ku li benda min in, dê neyên
şermezar kirin.
24 Gelo dê ji destên yê xwurt,
malê talanê bê stendin û li gor
ûsilê yên ku hêsîr ketine, dê bên
berdan? 25 Belê, XUDAN wusa
dibêje: Dê hêsîrên yên xwurt jî
ji destên wî bên stendin, malê
talanê ê ku zilamê tirsehêz sten-
diye, dê xelas bibe; ji ber ku ez ê
jî keftûleftê bi yê ku keftûleftê bi
te re dike re bikim û ez ê zarokên
te xelas bikim. 26 Û ez ê goştên
yên ku lêdanê li te dikin, bi wan re
bidim xwarin û dê bi xwîna xwe
mîna ku xemra şêrîn vexwarine
serxweş bibin û dê hemû afir bi-
zanibe, XUDANê ku te xelas kiri-
ye ez im û Xelaskerê te, Hêzdarê
Aqûp ez im.

*Gunehê Îsraêlê*

Yêr 3,6-8

50 XUDAN wusa dibêje: Ma
ka kaxeza berdanê ya ku
di derheqê serbest berdana dayi-
ka we de ye? Û ma min we firot
kîjan deyndarê xwe? A vay, hûn
ji ber fesadiya xwe hatin firotin û

ji ber gunehên we dayika we hate
berdan. 2 Ma çima gava ez hatim
kes nehat dîtin, çima dema bang
kirim yekî ku bersiv bide tunebû?
Ma qey destê min kin bûye ku, ni-
karibe bi fidyê ve xelas bike? An
jî bona azad kirinê bi min re qey
hêz nîne? A vay, ez bi pekandina
xwe behrê ziwa dikim, çeman di-
kim çol; ji ber ku av nemaye ma-
siyên wê gemar dibin û ji bêaviyê
dimirin. 3 Ez reşan li ezmanan di-
kim û rûberên wan dikim çol.
4 Bona ku ez bizanibim bi gotinê
bibim alîkarê zilamê westayî, Xu-
dan, XUDAN zimanê hînkiriyan
da min; her sibeh hişyar dike, bona
mîna hînkiriyan bibihîzim, guhê
min hişyar dike. 5 Xudan, XU-
DAN guhê min vekir û ez nebûm
asê û paş ve venekişiyam. 6 Pişta
xwe dam yên ku lê dixin, lamên
xwe dam yên ku bi neynûkan ve
diqeşêrin; wecê xwe ji şerm û tûkê
veneşartim. 7 Ji ber ku Xudan,
XUDAN alîkariyê bi min re dike;
ji ber vêya ez rezîl nebûm; ji ber
vêya, wecê xwe kirim mîna kevirê
hestê û dizanim ku ez ê neyêm
şermezar kirin. 8 Yê ku min bi heq
derdixe nêzîk e; ma dê kî bi min re
daraz bibe? Em pev re bisekinin;
neyarê min kî ye? Bila nêzîkî min
bibe! 9 A vay, dê Xudan, XUDAN
alîkariyê bi min re bike; yê ku dê
min sûcdar derxîne kî ye? A vay,
dê ew gişt, mîna kincan kevn bi-
bin; dê bizûzk wan bixwin û biqe-
dînin.
10 Ma di nav we de yê ku ji XU-
DAN ve ditirse, gotina qûlê wî
guhdarî dike kî heye? Yê ku di ta-
riyê de dimeşe û ronahiya wî nîne,
bila bi navê XUDAN ewle bibe
û xwe bisipêre Xwedê. 11 A vay,
hûn, yên ku agir pê dixin, bi çirûs-
kan xwe dixemilînin, hûn gişt, di
nava pêta agirê xwe û pêta ku we
pêxistine de bimeşin! Bona we, yê
ku dê ji destê min ve derkeve ev e:
Hûn ê di nava lêdanê de rakevin.

*XUDAN xemrevîniyê li Îsraêlê dike*

51 Ya hûn, ên ku li pêy dilso-
ziyê ve diçin, ên ku li XU-
DAN digerin, min guhdarî bikin!
Li zinarê ku bi kewartinê hûn jê
hatin stendin û li kortika ocaxa
kevir ya ku bi kolanê hûn jê hatin
stendin binêrin. 2 Li bapîrê xwe
Birahîm û li Saraya ku we aniye
dinê binêrin; ji ber, dema ku zi-
lamekî tenê bû bangî wî kirim û
wî pîroz kirim û wî zêde kirim.
3 Ji ber ku XUDAN xemrevîni-
yê li Siyonê kir; xemrevîniyê li
hemû xerabeyên wê kir û çola wê
kir mîna Adenê û beyara wê kir
mîna baxçeyê XUDAN; dê li wir,
dengê kêfxweşî û şahî, şikirî û si-
tirandinê hebe.
4 Min qenc guhdarî bikin, ya gelê
min! û ya netewa min, guh bidin
min; ji ber ku dê ji min zagonek

derkeve û bona ku ji neteweyan
re bibe şewleyek, ez ê dadiya xwe
zexim bikim. 5 Dadiya min nêzîk
e, xelasiya min derket holê û dê
bazûyên min serweriyê ji nete-
weyan re bikin; dê girav li benda
min bin û bi bazûya min ve ewle
bibin. 6 Çavên xwe rakin ezma-
nan, li jêr, li erdê jî binêrin; ji ber
ku dê ezman mîna duhê belav bi-
bin û erd jî mîna kincê kevin bibe;
yên ku li ser rûniştine jî dê wusa
bimirin, lê belê dê xelas kirina
min abadîn bibe û dawiya dadiya
min qut nebe.
7 Ya hûn, yên ku bi bawerî û ew-
lebûnê ve dizanin, netewa ku za-
gona min di dilê wan de ye, min
guhdarî bikin; ji heqareta miro-
van netirsin û ji kufrên wan bêzar
nebin! 8 Ji ber ku dê bizûzk wan
mîna kincan bixwin û dê kurm
wan mîna peşmê bixwin; lê belê
dê dadiya min abadîn û xelaski-
rina min di domahiya nifşeyan de
bimînin.
9 Ya bazûya XUDAN, hişyar
bibe, hişyar bibe, qudretê li xwe
bike! Mîna di rojên kevin de, di
nifşeyên herî kevin de hişyar
bibe! Ma yê ku Rehab perçe kiri-
ye û cenawir birîndar kiriye, ne tu
yî? 10 Ma yê ku behrê, avên balû-
pala mezin ziwa kiriye, bona ku
yên bi fîdyê ve xelas bûne derbas
bibin, cîhên herî kûr yê behrê kiri-
ye rêgeh, ne tu yî? 11 Û dê yên ku
XUDAN xelas kiriye vegerin û bi
sitrandinê bigihêjin Siyonê û dê li
ser serên wan, kêfxweşiya abadîn
hebe; dê bigehêjin kêfxweşî û
şabûnê û dê keser û nalîn birevin
û herin.
12 Yê ku xemrevîniyê li we dike
ez im, ez im; ma tu kî ye ku, ji mi-
rovê ku dê bimire û ji lawê zilamê
ku dê bibe mîna gîhê ditirsî? 13 Û
te, XUDANê ku ezmanan belav
kiriye û bingehên dinê daniye, yê
ku te afirandiye, ji bîr kir û gava
zordest, bona helaqê amade dibe,
tu ji hêrsbûna wî, di tûmiya rojê de
çima bêsekin bêzar dibî? Ma ka,
hêrsbûna zordest li ku ye? 14 Dê
hêsîrê sirgûn zû were berdan û ne-
mire, danekeve kortalê û bêyî nan
nemîne. 15 Ji ber ku Xwedayê te
XUDAN ez im, ez ku, behrê tev-
lîhev dikim û pêlên wê digurme;
navê wî XUDANê artêşa ye. 16 Û
ez, bona danîna ezmanan û avêtina
bingehên dinê û bona ku ji Siyonê
re: Netewa min tu yî! bibêjim, van
gotinên xwe xistim devê te, bi siya
destê xwe te nuxumandim.
17 Hişyar be, hişyar be, ya
Orşelîm, rabe ser pêlan, tu ku, te
tasa xezeba XUDAN ji destê wî
ve vexwar! Te tasa şewşiyê ve-
xwar û mêt! 18 Ji hemû zarokên
ku aniye dinê, yekî ku rê nîşanî
wê bide nîne û ji zarokên ku me-
zin kirine, yekî ku destê wê bigre
nîne. 19 Ev her du tişt hatin serê

te; ma kî bona te şînê bikişîne?
Rêbirî, xela û şûr; ez çawa xemre-
vîniyê li te bikim? 20 Zarokên te
şewş in, mîna aska ku ketiye torê,
li serê hemû kuçeyan radizên;
bi hêrsa XUDAN, bi pekandina
Xwedê ve tijî bûne.
21 Ya zebûn, tu ku serxweş bû, lê
belê ne ji xemrê, ji ber wê, niha
vêya guhdarî bike! 22 Xudanê te
XUDAN û Xwedayê te, ê ku doza
netewa te dibîne wusa dibêje: A
vay, min tasa şewşiyê, tasa xeze-
ba xwe ji destê te stend; êdî tuyê
carekî din nikaribe vexwe 23 û ez
ê wê bidim destên yên ku tengasi-
yê didine te, ew ku, ji canê te re:
Xwar bibe ku em derbas bibin!
gotin. Û te jî pişta xwe mîna axê
û mîna kuçê danî bin lingên kesên
ku derbas dibûn.

*Serweriya Xwedayê me*

52 Hişyar be, hişyar be, ya Si-
yon, hêza xwe li xwe bike!
Ya Orşelîm, bajarê pîroz, kincê
xwe yî xweşik li xwe bike! Ji ber
ku dê êdî zilamê bêsunet û min-
dar nekevin te. 2 Toza li ser xwe
dawişîne, rabe li texta xwe rûne,
ya Orşelîm! ji benê histuyê xwe
xelas be; qîza Siyonê ya sirgûn!
3 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Hûn bi tunebûnê ve hatin firotan
û hûn ê bi pere ve neyên xelas ki-
rin. 4 Ji ber ku Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Bona ku bi xerîbî
bijî, pêşiyê netewa min daket
Misirê û bêsedem Asûr tengasiyê
da wê. 5 Û niha XUDAN dibêje:
Madem ku netewa min bi tûne-
bûnê ve hatiye stendin û birin, ma
li vir çi karê min heye? Yên ku
li ser wan serweriyê dikin diûrin,
XUDAN dibêje û di tûmiya rojê
de ji navê min re kufrê dikin.
6 Ji ber vêya dê netewa min navê
min binase, ji ber vêya, dê ew roj
bizanibin yê ku gotiye ez im: A
vay, ez im!
7 Li ser çiyan lingê mizgînvan
çiqas xweşik in, ew Mizgînvan
ku gotina selametê dide bihîstin,
mizgîniya qenciyê tîne, xelasi-
yê dide bang kirin, ji Siyonê re
dibêje: Xwedayê te qiraletiyê
dike! 8 Dengê notirvanên te!
Dengên xwe bilind dikin, pev re
distirên; ji ber ku dema XUDAN
vegere Siyonê, dê ew bi çavê xwe
bibînin[1]. 9 Ya Orşelîm, wêrane-
yên wê, tevî kêfxweşiyê dest bi
sitirandinê bikin! Ji ber ku XU-
DAN xemrevîniyê li netewa xwe
ve kir, bi fidyê ve Orşelîmê xelas
kir. 10 XUDAN li ber hemû nete-
weyan piyê xwe yî pîroz firikand
û hemû nîçikên dinê xelasiya
Xwedanê me dîtin.
11 Vekişin! Vekişin! Ji wir derke-
vin, destê xwe li yê mindar nexin!
Ji hundirê wê ve derkevin; hûn ku

[1] Dê ji çav re çav bibînin.

taximên XUDAN dikişînin, xwe
paqij bikin! 12 Ji ber ku hûn ê
bi lezî dernekevin û bi revê hûn
ê neçin; ji ber ku dê XUDAN di
pêşiya we de here û dê Xwedayê
Îsraêlê ji we re bibe paşing[1].

*Êşkişandin û Bilindbûna Mesîh*

13 A vay, dê qûlê min bi baqilî
bike, bilind û hatiye bilind kirin
û dê zehf bilind bibe. 14 Çawa
ku gellekan bi te ecêbmayî bûn,
xuyanîbûna wî ji ya mirov û şiklê
wî ji yê lawê zilam ewqasî xera
bûbû, 15 dê bi vî awayî gellek ne-
teweyan şaş bihêle; dê qiral devê
xwe ji wî bigirin; ji ber ku dê tiştê
ku ji wan re nehatiye gotin bibînin
û yê ku nebihîstine fêhm bikin.

*Mesîh ji bo gunehkaran dibe Qurban*
Zeb 22; Lûq 24,25-27; K.Şa 8,32-35;
1.Pêt 2,21-25; Îbr 9,11-28; Yû 1,29

53 Ma kî bi nûçeya me bawer
bû? Û bazûyê XUDAN ji
kê re hate nîşan dayîn? 2 Ji ber ku
li ber wî mîna tirha teze û ji cîhê
ziwa mîna reha ajan derket; ne
şiklê wî ne jî xweşikya wî hebû;
şanîdaniya wî jî tunebû ku, dema
em lê binêrin, bila dilê me bibijê.
3 Biçûk hate dîtin û ji aliyê miro-
van ve hate berdan; zilamek janan
bû û ê ku êşan nas kiriye, mîna
zilamek ku mirov wecê xwe jê
duxumînin biçûk hate dîtin û me
wî nehesiband.
4 Bi rastî wî êşên me kişand û wî
janên me hilgirt; me got qey ew
hate ceza kirin, ji aliyê Xwedê
ve hate lêxistin û hate nizm kirin.
5 Lê belê ew ji ber gunehên me
birîndar bû, ji ber fesadiyên me
ew êşiya; cezaya ku bona aştiya[2]
me bû, daket ser wî û me bi
birînên wî şîfa dîtin. 6 Me hemû-
yan, mîna mîhan rê şaş kirin; her
yek ji me vegeriya ser rêya xwe
û XUDAN fesadiya me hemûyan
danî ser wî.
7 Muameleya xerab bi wî ve kirin,
lê belê dema hate nizm kirin devê
xwe venekir; mîna berxikê ku di-
bin serjêkirinê û mîna mîha ku li
ber hevringvanan bêziman diseki-
ne, devê xwe venekir. 8 Bi xedarî
hate darazkirin û rakirin; ma kî yê
ku di dema wî de dijiya fikirî ku,
ji warê zindiyan jêkirin û stendina
wî, ji berya gunehê netewa min
bû? 9 Û li ber neheqiyê nekiribû û
fenekî di devê wî de tunebû, dîsa
jî gor a wî li cem xeraban çêkirin,
lê belê di mirina xwe de tevî yê
dewlemend bû.
10 Lê belê lê tahde kirin, bi XU-
DAN ve xweş hate dîtin; wî
xist keserê; dema canê wî bibe
pêşkêşiya gunehê, dê nîjada xwe
bibîne, rojên temena xwe dirêj

1 Bibe dimdar, an jî: Paşmêrê we.
2 Xweşî, tenduristî.

bike û miraza XUDAN, di destê
wî de dê pêş ve biçe. 11 Dê keda
canê wî, berdariya xwe bibîne û
têr bibe; dê qûlê minî salih gelle-
kan bi zanîna xwe salih bike û ew
ê bi xwe fesadiyên wan hilgire.
12 Ji ber vêya, ez ê tevî mezinan
parê bidim wî û dê malê talanê
tevî bihêzan par bike; ji ber ku
canê xwe ji mirinê re rijand û bi
gunehkaran re hate hesibandin;
sûcê gellekan wî kişand û bona
gunehkaran lava kir.

*Xelasiya Îsraêlê*

54 Bistirê ya sitewr, tu ku, te
zarok neanî dinê! Dest bi
sitrandinê bike û bi dengê bilind
bang bike, te ku, te jana zayinê
nekişand! Ji ber ku lawên pîreka
ku hatiye berdan, ji lawên pîreka
bi mêr zêdetir in, XUDAN dibêje.
2 Cîhê çadira xwe fireh bike û
bila dawên şunwarên te bişidînin;
neparêze, tayên xwe dirêj bike û
singên xwe bizexmîne! 3 Ji ber ku
tuyê xwe bi çep û rastê ve berde û
dê nîjada te neteweyan ji xwe re
bikin milk û bajarên bêkes, dê bi
gel ve tijî bikin.
4 Metirse, ji ber ku tuyê şermezar
nebe û aciz nebe, ji ber ku dê
wecê te sor nebe; ji ber ku tuyê
şerma ciwantiya xwe ji bîr bike.
Û tuyê êdî qala rezaletiya bîbûna
xwe neke. 5 Ji ber ku zilamê te, yê
ku te Afirandiye yî; navê wî, XU-
DANê artêşa ye û yê ku te bi fidyê
ve xelas kiriye, Pîrozê Îsraêlê ye;
dê jê re, Xwedayê hemûya dinê
bête gotin. 6 XUDAN te mîna
pîrekek hatiye berdan û ruhê wê
bi derd, çawa ku jina ciwantiyê
dema bê avêtin dibe, wusa bangî
te kir, Xwedayê te dibêje. 7 Tenê,
demekî kurt te berdam; lê belê ez
ê te bi dilovaniyên mezin bidim
hev. 8 Bi hêrsekî mezin, demekî
kurt wecê xwe ji te veşartim; lê
belê ez ê bi xêrekî abadîn dilova-
niyê li te bikim, XUDANê ku bi
fidyê ve te xelas kiriye dibêje.
9 Ji ber ku ev bona min, mîna avên
Nûh in; ji ber ku çawa bi gotina,
dê êdî avên Nûh rûyê erdê negi-
rin, sondê xwaribim, bi gotina, ez
ê li dijî te jî hêrs nebim û ez ê bi
te nepekim, wusa sondê xwarim.
10 Ji ber ku çiya ji cîhên xwe radi-
bin û gir dilerizin, lê belê xêra min
ji ser te ve ranabe û sonda minî
selametê ranabe, XUDANê ku di-
lovaniyê li te kiriye dibêje.
11 Ya tu, zebûnê ku bi bahozê
ketiye û xemrevîniyê nedîtiye, a
vay, ez ê bi xercên rengên xweşik
kevirên te deynim cîhên wan û bi
yaqûtên ezmanî ve bingehên te
bavêjim. 12 Û ez ê bi yaqûtan ve
zeraqên te û bi yaqûtên gewez ve
deriyên te û bi kevirên biqîmet ve
hemû dora te çê bikim. 13 Û dê
hemû lawên te ji aliyê XUDAN
ve hatibin hîn kirin û dê selameta

lawên te zehf be. 14 Tuyê bi rasti-
yê bizexm e; tuyê dûrî tengasiyê
be, ji ber ku tuyê netirse û tuyê
dûrî bêzarbûnê be, ji ber ku dê
nêzîkî te nebe. 15 A vay, ew di-
civin, lê belê ne ji min; her kî ku
li dijî te bicive, dê ji ber te bike-
ve. 16 A vay, min hesinkarê ku bi
agirê xwe yî sor pif dike û li gor
karê xwe çekan derdixe afirandin
û bona ku xera bike, min helaq-
kir afirandin. 17 Qet çekên ku li
dijî te hatine çêkirin, dê ji tu karî
re nebe û tuyê her zimanê ku di
daraziyê de li dijî te rabe, sûcdar
derxîne. Mêrasa qûlên XUDAN
ev e û rastiya wan ji min e, XU-
DAN dibêje.

*Banga XUDAN*

55 Ya hûn! her yê ku tî bûye
û perê wî nîne, werin avan;
werin bistînin û bixwin! Belê,
werin û bêpere û bê berdêl xemr
û şîr rahêlin! 2 Ma çima hûn perê
xwe didin tiştê ku nan nîne û keda
xwe didin tiştê ku têr nake? Min
baş guhdarî bikin û tiştê qenc bi-
xwin û bila bi tiştê qelew canê we
tahmê bibîne! 3 Guhên xwe xwar
bikin û werin cem min; bibihîzin
û dê canê we bijî û ez ê dilova-
niyên ewlekar ên ku ji Dawid re
bûn, peymana abadîn, bi we re bi-
birim. 4 A vay, min wî bi şahdeyî
ji gelan re, bi serokantî û mîrantî
da gelan. 5 A vay, tuyê bangî ne-
teweyek ku tu nas nakî bike; ne-
teweyek ku bi te nizane, dê ji ber
Xwedayê te XUDAN û Pîrozê Îs-
raêlê ve bazde cem te; ji ber ku wî
mezintiyê da te.
6 Hîn ku XUDAN tête dîtin, lê
bigerin; hîn ku nêzîk e, bangî
wî bikin! 7 Bila kesê xerab rêya
xwe û yê ku fesadiyê dike bila
ramanên xwe berde û vegere XU-
DAN û dê ew jê re dilovaniyê
bike û bila vegere Xwedayê me,
ji ber ku bi zêdeyî dê ew biborîne.
8 Ji ber ku ramanên min ne fikrên
we ne, rêyên we ne rêyên min in,
XUDAN dibêje. 9 Ji ber ku her
çawa ezman ji erdê bilindtir bin,
rêyên min ji rêyên we û ramanên
min ji ramanên we wusa bilindtir
in. 10 Ji ber ku çawa berf û baran
ji ezmên ve dakevin û venegerin
wir, lê belê erdê avdan bikin û wê
bidin zayîn û zad ji erdê ve biqe-
dînin û tovê bidin cotkar û nan
bidin xwarinkar; 11 dê gotina min
ya ku ji devê min ve derkeve ji
wusa bibe; dê vala venegere min,
lê belê tiştê ku miraz kirime, dê
bike û dê karê bona ku bike wê
şandime bike! 12 Ji ber ku hûn
ê bi kêfxweşiyê ve derkevin û bi
selametê ve werin birin; dê çiya û
gir li ber we dest bi sitranê bikin
û dê hemû darên beyar dest bi
lêxistina çepikan bixin. 13 Dê li
dêvla deviyê qaj derkeve û li dêv-
la gezokê mûtik derkeve; ev tişta,

bona ku ji XUDAN re bibe nav
û deng, bibe nîşanek abadîn ya
neyê jêkirin û avêtin dê bibe.

*XUDAN Neteweyan qebûl dike*

56 XUDAN wusa dibêje: Bi
yê rast bigirin û dadiyê
bikin! Ji ber ku hatina xelas kirina
min û nîşandayîna min nêzîk e.
2 Xwezî li mirovê ku vêya dike
û xwezî li lawê mirov yê ku bi
zexmî bi vêya digire! Ew zilamê
ku, bona roja Sebtê xera neke wê
digire û destê xwe ji her cûreyê
xerabiyê ve digire. 3 Biyanê ku bi
XUDAN ve dizeliqe, bila gotina:
Muheqeq dê XUDAN min ji ne-
teweya xwe cuda bike! nebêje û
yê xesandî[1] bila: A vay, ez darekî
ziwa me! nebêje. 4 Ji ber ku, XU-
DAN, bona kesên rojên minî Seb-
tê digirin û tiştên ku bi xweşiya
min ve dihere dibijêre û bona yên
xesandî[2], ên ku bi zexmî bi pey-
mana min ve digirin wusa dibêje:
5 Ez ê ji wan re di mala xwe û di
nava dîwarên xwe de ji qîz û la-
wan cîh û navên qenc bidim; ez ê
navekî abadîn ê ku nayê jêkirin û
avêtin bidim wan.
6 Û ez ê biyanên xwe, ên ku bona
xizmetê ji XUDAN re bikin û ji
navê XUDAN hez bikin û bona
ku jê re bibin qûl bi XUDAN ve
zeliqîne, ên ku bi her yekên bona
ku roja Sebtê xera nebe, bi wê gir-
tine û bi zexmî bi peymana min
ve girtine, 7 belê, ez ê wan bînim
çiyayê xwe yî pîroz û ez ê wan di
mala xwe yî duayê de kêfxweş
bikim; qurban û pêşkêşiyên wan,
ên ku li ser pêşkêşîgeha min hati-
ne şewitandin, dê werin qebûl ki-
rin; ji ber ku dê bona hemû nete-
weyan ji mala min re mala duayê
bête gotin. 8 Xudan, XUDANê ku
sirgûnên Îsraêlê civandine dibêje:
Xeynî yên ku hatine civandin ez ê
hîn ji wî re bicivînim.

*Serekên xerab yên Îsraêlê têne darazkirin*

9 Ya heywanên beyarê, hûn gişt,
heywanên ku li daristanê ne, bona
xwarin û qedandinê werin! 10 No-
tirvanên wê kor in, qet zaniyariya
yekî nîne; gişt kûçikên bêziman
in, nikarin biewtin; di ber xwe de
dibilînin û vedikevin[3] ji xewê ve
hez dikin. 11 Belê, kûçik çilek in,
bi têrbûnê nizan in; ew şivanên
ku bi zanebûnê ve nizanin in! Ji
her alî ve her kes vegeriya qezen-
ca xwe, her kes vegeriyan rêyên
xwe. 12 Werin, xemrê bînin û têra
xwe araqê vexwin; mîna sibê an
jî wekî îroj, dê bi zêdeyî pirr bibe
dibêjin!

[1] An jî: Axayê haremê.
[2] An jî: Axayên haremê.
[3] Radikevin.

*Gelê bêwefa*

57 Zilamê salih tune dibe û
kesî ku vêya bixe dilê xwe
nîne û zilamên dilovan ji holê ve
tên rakirin û tu kes fêhm nake ku
zilamê salih, ji ber xerabiya ku
dê were tête rakirin. 2 Ew dike-
ve selametiyê; yên ku bi rastiyê
ve dimeşin li ser livînên xwe ve
rehet dikin.
3 Lê belê hûn, lawên pîreka nihêrt-
van, nîjada zinêker û fahîşê, nêzîkî
vir bibin! 4 Ma hûn bi kê re qerfa
xwe dikin? Devê xwe li ber kî ve-
dikin û zimanê xwe derdixînin? 5
Hûn ku, di nava darçiloyan de, di
bin her darên hêşîn de sor dibin û
di geliyan de û di quntarên zinaran
de zarokan dixeniqînin, ma hûn
ne zarokên gunehê, nîjada feneki-
yê ne? 6 Para te, di nava kevirên
geliyê yên rast de ne; ew, nisîbên
te ew in; te ji wan re jî pêşkêşiya
rijandinê rijand, te pêşkêşiya nan
pêşkêş kir. Ma li ser vana ez ê
xemrevîniyê bibînim? 7 Te livî-
na xwe danî ser çiyayekî bilind û
mezin; bona qurban serjêkirinê jî
tu hilkişiya ser wir. 8 Û te nîşanên
erjeng[1] danî paş deriyan û çilmêre-
yên deriyan; ji ber ku te ji xeynî
min ji yekî din re xwe tazî kir û
hilkişiya jor; livîna xwe fireh kir
û bona xwe bi wan re sozê birrî;
te li cîhê ku dît, ji livînê wan ve
hez kir. 9 Û tu bi rûnê bêhnxweş
ve çû cem qiral û te bêhnên xwe
yî xweş zêde kir û şandiyên
xwe şand dûra û xwe heta warê
miriyan nizm kir. 10 Tu bi dirêji-
ya rêya xwe ve westiya, te negot:
Vala yî! Te quweta xwe teze kir; ji
ber vêya tu lawaz neket.
11 Û tu ji kê ve bêzar bû û tirsi-
ya ku, tu derewan dibêjî û te çima
min di bîra xwe de neanî û vêya
nexist dilê xwe? Ma ji demekê
dirêj ve ez bêdeng nemam? Û tu
ji min ve natirse! 12 Ez ê rasti-
ya te bidim bihîstin; lê karên te,
dê faydeyek wan ji te re nebe[2].
13 Dema tu biqêrî, bila pûtên ku
te li cem hev civandine te azad
bikin! lê belê dê ba wan paqij bike
û bibe, dê hilmek wan hemûyan
bibe; tenê yê ku xwe bi min ve
bisitirîne, dê warê ji xwe re bike
milk û çiyayê minî pîroz ji xwe re
bi mêrasî bigire.

*Gotina XUDAN ya şîfayê*

14 Û dê bibêje: Axê kom bikin,
axê birijînin, rê amade bikin, ji
rêya netewa min tilpekiyê rakin!
15 Ji ber yê ku bilind û hatiye bi-
lind kirin, yê ku di abadîniyê de
bi aram û navê wî Pîroz e wusa
dibêje: Ez li cîhê bilind û pîroz rû-
dinim û bona ruhên dilnizman bi-
vejînim û bona dilên yên ku zulmê

*1* (5.Mûsa 6:9)

2 Dê tu qenciya wan ji te re nebe.

dîtine bivejînim, ez bi zilamê dil-
nizm û zulmê dîtiye re me. 16 Ji
ber ku ez abadîn nabim dozdar û
her tim hêrs nabim; ji ber ku can û
ruhên ku afirandibûm, li ber min ji
xwe ve diçûn. 17 Ez ji ber qezen-
ca wî ya xerab, fesadiyê ve hêrs
bûm û li wî xistim; wecê xwe nu-
xumandim û hêrs bûm û cebaniyê
kir û di rêya dilê xwe de meşiya.
18 Rêyên wî dîtim û ez ê şîfa bi-
dim wî û ez ê rê nîşanî wî bidim,
dîsa ez ê bi xemrevîniyê bersivê
bidim wî û yên ku bona wî şînê
dikişînin. 19 Ê ku mêwên lêvan
afirandiye ez im; aştî, bila ji yê ku
li dûrayî û li nêzîkêyî re aştî bibe!
XUDAN dibêje û ez ê şîfa bidim
wî. 20 Lê belê xerab, mîna behra
ku diçelqe ne; ji ber ku ew rehet
nasekine û avên wî herî û gemarê
davêje derve. 21 Xwedayê min
dibêje: Ji xeraban re aştî nîne!

*Rojiya Rasteqîn*

58 Bi dengê bilind bang bike,
neparêze! dengê xwe mîna
boriyê bilind bike û gunehên wan
ji netewa min re û sûcên wan ji
mala Aqûp re bibêje! 2 Ya rastî,
her roj li min digerin û bi zanîna
rêyên min kêfxweş dibin; mîna
neteweyek dadiyê kiriye û dev ji
daraziyên Xwedê bernedayiye,
daraziyên rast ji min ve dipirsin; ji
nêzîkbûna Xwedê ve kêfxweş di-
bin. 3 Ma çima me rojî girtin û tu
nabînî? Me canên xwe nizm kirin
û tu pê nizanî? dibêjin. A vay, hûn
di roja rojiya xwe de li pêy karên
xwe ne û tengasiyê li hemû kar-
kerên xwe ve dikin. 4 A vay, hûn
bona şer û keftûleftê û bona ku bi
kulmika xerabiyê lêxin, rojiyê di-
girin; hûn îro wusa rojiyê nagirin
ku, li cîhê bilind dengên xwe bidin
bihîstin. 5 Rojiya ku min bijartiye,
roja ku dê canê mirov bête nizm
kirin, ma wusa dibe? Ma mîna qa-
miran serî xwar kirin û li binê xwe
ve cilik û xwelî raxistine? Ma tu ji
vêya re dibêje rojî û bona XUDAN
roja meqbûl? 6 Vekirina zincîrên
xerabiyê, sistkirina qeydên nîrê û
azad kirina ên ku zulmê dîtine, ma
ne ev e rojiya ku bijartime? 7 Ma
ne nanê xwe bi yê birçî re par ki-
rin û zebûnên bêcîh û bêwar anîna
mala xwe û dema yê tazî bibîne,
ser wî nuxumandin û ji yê ku ji
goştê xwe nede alî ne[1]? 8 Wê gavê
ronahiya te mîna berbangê dizê û
birîna te zû şîfayê dibîne û rastiya
te, ji pêşiya te ve dimeşe; mezi-
nahiya XUDAN dibe hêza li pêy
te. 9 Wê gavê tuyê bangî alîkariyê
bikî; dê XUDAN bersivê bide û
tuyê biqêrî û dê: A vay, ez li vir
im! bibêje.
Ger tu nîrê, tilîk dirêj kirinê û fe-
sadî gotinê ji nava we rake 10 û
tiştê ku dilê wî dibijê bidî yê ku

[1] Yanê ji mirovên xwe alîkariya xwe neparêzin.

birçî û canê ku hatiye nizm kirin
têr bikî; wê gavê dê ji nava tariyê
ve ronahiya te bizê û reş tariya te
bibe mîna wexta nîvrojê. 11 Û dê
her tim XUDAN rê nîşanî te bide
û li cîhê ziwa dê canê te têr bike û
hestiyên te xwurt bike û tuyê bibe
mîna bexçeyek hatiye avdan kirin
û mîna çavkaniyek ne derewîn e.
12 Û yên ku dê ji te derkevin, dê
xerabeyên kevin ava bikin; tuyê
bingehên gellek nifşeyan deyne[1]
û ji te re dê: Yê ku neqeban digire,
bona li welêt were rûniştin, yê ku
rêyan dike mîna berê, bête gotin.
13 Ger tu di roja minî pîroz de,
xwesteka xwe neke û roja Sebtê
negre bin lingên xwe û tu ji roja
Sebtê re bibêjî roja fireh, ji roja
pîroz ya XUDAN re bibêjî roja
mezin û bi nemeşîna rêyên xwe
û bi zewqa xwe negirtinê ve û bi
negotina gotinên xwe ve tu mezi-
nahiyê bide wê rojê; 14 wê gavê,
tu zewqa xwe di XUDAN de bi-
bînî û ez ê te li ser cîhên bilind, ên
dinê siwar bikim û mêrasa bapîrê
te Aqûp, bi te ve bidim xwarin! Ji
ber ku devê XUDAN got.

*Guneh û mukirhatin*

59 A vay, ma destê XUDAN
kin nebûye ku, nikaribe
xelas bike û guhê wî giran nebû
ku, nikaribe bibihîze; 2 lê tenê fe-
sadiyên we cudayiyê danîn nava
we û Xwedayê we û sûcên we,
wecê wî ji we veşêrt ku we na-
bihîze! 3 Ji ber ku destên we bi
xwînê û tilîkên we bi fesadiyê ve
gemarî bûn; lêvên we derewan
gotin, zimanê we kufekufa xe-
rabiyê dike. 4 Kesî ku bi rastiyê
dozê veke nîne û yê ku bi rasteqî-
niyê dozê bajo nîne; bi valahiyê
ve ewle dibin û derewan dibêjin;
bi xerabiyê ve avis dimînin û fe-
sadiyê dizên. 5 Ji hêkên marên
bijahr ve çêlikan derdixin û tev-
nika pîrikê dirêsînin; yê ku ji
hêkên wan bixwe, dê bimire û ji
hêka ku dişikê margîsk derdike-
ve. 6 Ji tevnikên wan kinc nabe û
bi kirinên wan mirov nikare xwe
buxumîne; kirinên wan karên
fesadiyan e û di destên wan de,
karê zordestiyê heye. 7 Lingên
wan berbi xerabiyê ve direvin û
bona rijandina xwîna bêsûc di-
lezînin; ramanên wan, ramanên
fesadiyê ne; rêbirî û şikestandin
di rêyên wan de hene. 8 Bi rêya
aştiyê ve nizanin û di şopên wan
de dadî nîne; ji xwe re rêyên çewt
çêkirin; tu kesê ku di wê rêyê de
dimeşe bi aştiyê ve nizanin.
9 Ji ber vêya, dadî ji me dûr e û
rastî nagîhêje me û a vay tarîbûn;
em li benda çirûskê ne, lê belê em
di reştariyê de dimeşin! 10 Em
mîna koran bi alîkariya destan li
dîwêr digerin û mîna yê ku çavê wî

1 Biçikîne.

nîne lêkolînê dikin; nîvrojê mîna
di tarîreşê de bin tilpekî dibin; di
nava xwurtan de em mîna miriyan
in. 11 Em giştmîna hirçan hume
humê dikin û mîna kevokan zehf
dinalin; em li benda dadiyê ne û
nîne; em li hêviya xelasiyê ne, ji
me dûr e. 12 Ji ber ku li hember te
gunehên me zêde bûn û sûcên me
li dijî me şahdeyiyê dikin; ji ber
ku gunehên me li cem me ne, lê
fesadiyên me jî, em bi wan diza-
nin; 13 me guneh kirin û XUDAN
înkar kirin û ji pêy Xwedayê xwe
vegeriyan, me gotina zordestî û
serîhildanê gotin, ji dil ve gotinên
fenekiyê fikirîn û gotin. 14 Û maf,
şunda hate zivirandin û rastî li dûr
ve disekine; ji ber ku rasteqînî li
qada bajêr tilpekî bû ket û rastî ni-
kare bikeve hundir. 15 Belê, ras-
teqînî nayê dîtin û yê ku ji şerê ve
ditirse, xwe dide tazî kirin.

*Dê XUDAN Gelê xwe xelas bike*

Û XUDAN dît û tunebûna dadiyê,
di çavên wî de xerab bû. 16 Û dît ku,
zilam nîne û bi tunebûna navçîtiyê
bû û bona wî, bazûya wî xelasiyê
anî û rastiya wî, ew ji wî re bû alî-
kar. 17 Û dadiyê, mîna zirxê li xwe
kir û mîxfera xelasiyê danî ser serê
xwe û cilê tolhildanê mîna kincekî
li xwe kir û mîna qeftanekê xwe li
xîretê pêça. 18 Karên wî çawa be
li gor wê, dê xeydê bide neyarên
xwe û cezê bide dijminên xwe; dê
cezê bide giravayan. 19 Û yên ku ji
rojavayê ne, dê ji navê XUDAN û
yên ku ji rojhilatê ne, dê ji mezina-
hiya wî bitirsin; ji ber ku dê mîna
avên çemekî ku cîhê wê teng bûyî
were, ew avên ku hilma XUDAN
wan dajon. 20 Û dê ji Siyonê re û ji
yên ku di Aqûp de ji gunehê ve zi-
virîne, yê ku bi fîdyê ve xelas dike
were, XUDAN dibêje. 21 Lê ez jî,
XUDAN dibêje, ji wan re peyma-
na min ev e: Ruhê min ê ku li ser
te ye û gotinên min ên ku xistime
devê te, ji niha ve ta heta abadînê,
dê ji devê te û ji devê nîjada te û
ji devê nîjada nîjada te kêm[1] nebe,
XUDAN dibêje.

*Hatina Orşelîmê ya Birewnaq*

Pey 21,9-27

60 Rabe, ronî bibe! Ji ber ku
ronahiya te hat û mezinahi-
ya XUDAN li ser te ve hilat! 2 Ji
ber ku, a vay, dê tarî dinê û tariya
reş gelan binuxumîne; lê belê dê
XUDAN li ser te ve bihilê û dê
mezintiya wî li ser te bê xuyanî
bûn. 3 Û dê netewe werin rona-
hiya te û qiral dê werin ronahiya
roja ku ji te re dihilê.

4 Dor be dor çavên xwe rake û
binêre! Hemû dicivin û tên cem
te; dê lawên te ji dûr ve werin û
qîzên te di himbêzan de dê werin
kişandin. 5 Tuyê wê gavê bibînî

[1] Cuda.

û dê wecê te bibiriqe û dilê te li
hev bikeve û fireh bibe; ji ber ku
dê dewlemendiya behrê berbi te
ve bête zivirandin, dewlemendiya
neteweyan ji te re were. 6 Dê zê-
deyiya deveyan, deveyên civan ên
Midyan û Eyfayê, dora te bigirin;
hemûyên ku ji Şebayê ne, dê we-
rin; dê zêr û gunukê bînin û pesnên
XUDAN bang bikin. 7 Dê hemû
keriyên Kedarê ji te re bicivin, be-
ranên Nebayotê ji te re bibin; dê bi
meqbûlî hilkişin pêşkêşîgeha min
û ez ê mala xweşikiya xwe bixe-
milînim. 8 Ma vanê mîna ewrekê
û mîna kevokên ku berbi qulên
hêlînên xwe difirin kî ne? 9 Bi rastî
girava û pêşiyê keştiyên Tarşîşê dê
li benda min bimînin; da ku, ji dûr
ve lawên te, tevî zîv û zêrên wan,
bona navê Xwedayê te XUDAN
û bona Pîrozê Îsraêlê bînin; ji ber
ku, ya xweşikiyê dide te ew e.
10 Û dê yên biyan dîwarên te ava
bikin û qiralên wan xizmetê ji te re
bikin; ji ber ku, di hêrsa xwe de li te
xistim, lê belê bi xêra xwe dilova-
niyê li te kirim. 11 Û dê her tim de-
riyên min vekirî bin; bona ku wa-
riyetên neteweyan û qiralên wanî
bi sirgûnî hatine ji te re bînin, dê
bi şev û roj neyên girtin. 12 Ji ber
ku dê netewe û welatê ku qûlitiyê ji
te re nekin, tune bibin û netewe dê
bi tûmî xera bibin. 13 Serwiya ku
mezintiya Lubnanê yî, çinar û darê
şimşîrê, bona ku cîhê minî Pîroz bi-
xemilînin, dê pev re werin cem te û
ez ê cîhê lingên xwe pîroz bikim. 14
Û dê lawên yên ku tengasiyê didin
te pev re xwar bibin û werin cem
te û hemûyên ku te biçûk dibînin,
dê di navkoyên lingên te de xwar
bibin û ji te re: Bajarê XUDAN, Si-
yona Pîrozê Îsraêl, bibêjin.
15 Ez ê li ber berdana te û keri-
handinê dîtina te û ji ber ku tu kes
di nav te de derbas nabe, dê te bi
pesnahiya abadîn û ji pirr nifşeyan
re bikim şahî û kêfxweşî. 16 Û
tuyê şîrê neteweyan bimêje û tuyê
pêsîrên qiralan bimêje û tuyê biza-
nibe, yê ku te xelas kiriye û bi fîdyê
bûye Xelaskerê te, Bihêzê Aqûp,
XUDAN ez im. 17 Ez ê dêvla tûncê
zêr bînim û dêvla hesin zîv û dêv-
la dar tûnc û dêvla kevir ez ê he-
sin bînim. Û ez ê karmendên te aştî
bikim suxrevanên te jî dadî. 18 Dê
êdî li welatê te zordestî, di sînorên
wê de şêlandin û şikestandin
neyên bihîstin; lê belê tuyê navê
Xelasiyê li dîwarên xwe û navê
Pesnê li deriyên xwe bikî. 19 Dê
bi rojê êdî roj nebe ronahiya te û
bona ronahiyê heyv dê şewlê nede
te; lê belê dê ronahiya te yî abadîn
XUDAN û mezinahiya te Xwedayê
te be. 20 Dê êdî roja te neçe ava û
heyva te venekişe; ji ber ku dê XU-
DAN bibe ronahiya te yî abadîn û
dê dawiya rojên te yî şînê werin.

*1* Fîdan.

21 Û dê netewa te, hemû bibin zi-
lamên salih; ew şitila[1] bona ku me-
zintiyê bibînim çikandibûm, karên
destên min in, dê warê abadîn ji
xwe re bikin milk. 22 Dê biçûkê wê
hezar kes û ya hûrikê wê bibe ne-
teweyek xwurt; ez, XUDAN, dema
wexta wê bê, ez ê vêya bilezînim!

*Mesîh şandina xwe dide xuyakirin*
Lûq 4,18-21

61 Ruhê Xudan, XUDAN li
ser min e; ji ber, bona ku
mizgîniyê ji dilnizman re waz
bikim, XUDAN min mesh kir;
bona ku birînê yên dilşikestî
bipêçim, ji sirgûnan re azadiyê,
bona ku ji girtiyan re bang ki-
rina vebûna girtîgehan, 2 bona
bang kirina sala xêrê ya XUDAN
û roja tol hildana Xwedayê me,
bona xemrevîniya hemû kesên
bişîn, 3 bona li Siyonê ji kesên
şînê dikişînin re dêvla xweliyê ji
seriyan re çeleng, dêvla şînê rûnê
kêfxweşiyê, bona li dêvla ruhê
giraniyê, dayîna kincê pesnê min
şand ku, bila ji wan re darên rasti-
yê, yên ku XUDAN bona mezin-
tiyê bibîne çikandine, bête gotin.
4 Û dê xerabeyên kevnare ava
bikin, wêraneyên demên kevin
dê damezirînin û bajarên xera-
be, wêraneyê ji gellek nifşeyan
ve mane nû bikin. 5 Û dê biyan
bisekinin û keriyên we bajon û
yên xerîb bibin rezvan û cotkarên
we. 6 Lê belê dê ji we re, kahînên
XUDAN bête gotin; dê ji we re
bibêjin, xizmetkarên Xwedayê
me; hûn ê hebûnên neteweyan
bixwin. 7 Li ber şermezariya we,
dê bi du qatî mezintiya we bibe û
bi berdêla rezaletiyê dê bi parên
xwe ve kêfxweş bibin; ji ber vêya
dê li welatê xwe bibin xwediyê
milkê du qatî zêde; dê ji wan re
kêfxweşiya abadîn hebe. 8 Ji ber
ku ez, XUDAN, ez ji dadiyê ve hez
dikim; ji fesadî û şelandinkirinê
ve dikerihim û ez ê berdêla wan
bi dilsozî bidim wan û ez ê bi wan
re peymanek abadîn daynim. 9 Û
dê nîjadên wan di nava gelan de
û yên ku ji wan derketine di nav
neteweyan de bên zanîn; heçiyên
ku wan bibînin, dê bi gotina, nîja-
da ku XUDAN wan pîroz kiriye,
nas bikin.
10 Ez ê bi XUDAN re zehf
kêfxweş bibim, dê canê min bi
Xwedayê min re kêfxweş bibe! Ji
ber ku zava, mîna ku bi çelengê ve
bête xemilandin û bûk mîna bi ta-
ximên xwe ve xemilandibe, kincê
xelasiyê li min kir, bi qeftanê ras-
tiyê min nuxumand. 11 Ji ber ku
ax çawa gonceya xwe derxîne û
bexçe, tiştên ku tê de hatine çandin,
çawa ji erdê ve derxîne, dê Xudan,
XUDAN jî li ber hemû neteweyan
rastî û pesnê wusa derxîne.

*Lavayên ji bo Xelasiya Orşelîmê*
Îşa 61,3-11; Zeb 122,6-9

62 Heta ku rastiya Siyonê
mîna ronahiya ku dibi-
riqe û xelasiya wê mîna pêtala
ku dişewite derkeve holê, ez di
oxra wî de bêdeng nabim û di
oxra Orşelîmê de ez ê rehet ne-
kim. 2 Dê hemû netewe jî rastiya
te û hemû qiral mezinahiya te bi-
bînin û tuyê bi navekî nû, yê ku
bi devê XUDAN ve hatiyê gotin
bête bang kirin. 3 Û tuyê di destê
XUDAN de bibe taca xweşikiyê û
di destê Xwedayê xwe de bibe çe-
lenga qiraletiyê. 4 Dê êdî ji te re:
Jina ku hatiye berdan neyê gotin
û êdî ji warê te re dê wêrane neyê
gotin, lê belê dê ji te re: Heftsî-Ba[1]
û ji warê te re: Beûla[2] bête gotin; ji
ber ku XUDAN ji te hez dike û dê
warê te here mêr. 5 Ji ber, çawa ku
egîdek ciwan bi qîzek neçûye mêr
ve bizewice, dê lawên te jî bi te re
wusa bizewicin û zava bi bûkê re
çawa kêfxweş bibe, dê Xwedayê
te jî bi te re wusa kêfxweş bibe.
6 Ya Orşelîm, notirvanan danîm
ser dîwarên te; dê bi şev û rojê qet
bêdeng nebin; ya hûn, ên ku di bîra
XUDAN de tînin, rehetiyê nedin
xwe! 7 Heta ku Orşelîmê bizex-
mîne, li dinê wê bi pesnê deyne,
rehetiyê nedin wî jî! 8 XUDAN
bona mafê destê xwe yî rast û hêza
xwe sondê da: Rastî, êdî ez ê ge-
nimên te, bona ku bikin xwarin
nedim neyarên te û dê yên biyan
xemra te, ya ku te bona wê kedê
dabû venexwin; 9 tenê yên ku di-
din hev dê wê bixwin û ji XUDAN
re pesnê bidin û yên ku wê didin
hev, dê di hewşên cîhên minî herî
pîroz de wê vexwin.
10 Derbas bin, ji deriyan ve der-
bas bin; rêya netewa min amade
bikin; kom bikin, rêya mezin kom
bikin; kevirên wê rakin û bavêjin;
bona neteweyan alekê biçikînin!
11 A vay, XUDAN bi nîçika erdê
ve da bihîstin: Ji qîza Siyonê re bi-
bêjin: A vay, xelasiya te tê! A vay,
mîşeya wî tevî wî ye û berdêla wî
li pêşiya wî ye! 12 Û dê ji wan re:
Netewa pîroz, yên ku XUDAN
wan bi fidyê ve xelas kirine, bête
gotin û tuyê bi gotina: Yê ku lê
hatiye gerandin, bajarê ku: Neha-
tiye berdan, bête bang kirin.

*Hêza XUDAN*

63 Yê ku ji Edomê, bi kincê
sipî ji Botsrayê tê kî ye?
Ev ê ku di kincê xwe de bi rew-
naqî, di mezinahiya hêza xwe de
dimeşe kî ye? Ew ez im ku, bi da-
diyê ve dibêjim, di xelas kirinê de
bi qudret im. 2 Ma çima di kincê
te de sorî heye û ma çima kincê te
mîna kincê yê ku di mahserê de

1 Zewqa min di wê de ye.
2 Pîreka bi mêr.

tirî dieciqîne ye? 3 Ez, tena xwe
pêlê mahserê kirim û li cem min,
ji neteweyan tu kes tune bû û di
hêrsa xwe de wan eciqandim û bi
xeyda xwe wan girtim bin pêlên
xwe û xwîna wan pişkiya ser kin-
cê min û min hemû kincên xwe
gemarî kir. 4 Ji ber ku di dilê min
de roja tolhildanê hebû û sala yên
ku bi fidyê ve xelas kirime hati-
ye. 5 Û nihêrtim ku, alîkariyê min
tune bû û bi tunebûna alîkariyê
min ez şaş mam û bazûya min xe-
lasiyê ji min re anî û xeyda min,
ew ji min re bû alîkar. 6 Û di hêrsa
xwe de neteweyan eciqandim û di
xeyda xwe de wan şikestandim û
xwîna wan bi erdê ve rijandim.

*Qenciya XUDAN*

7 Li gor hemû tiştên ku XUDAN
daye me, ez ê xêrên XUDAN û pes-
nên XUDAN û ji zêdeyiya xêrên
wî û qenciya ku li gor dilovaniya
xwe daye, qenciya mezin ya ku ji
mala Îsraêl re, di bîra xwe de bînim.
8 Ji ber ku wî got: Rastî, ew netewa
min in, lawên ku hîlê nakin in! û ew
ji wan re bû Xelasker. 9 Di tenga-
siya wan hemûyan de ew aciz bû û
milyaketê wecê wî, wan xelas kir;
di hezkirin û dilovaniya xwe de
wan bi fidyê ve xelas kir û wan ra
kirin û di hemû rojên kevin de wan
kişand.
10 Lê belê ew bûn asê û Ruhê wî
yê Pîroz êşandin; ew jî xwe gu-
hert û bû neyarê wan û bi xwe bi
wan re cengê kir. 11 Wê gavê ne-
tewa wî rojên kevin, rojên Mûsa
di bîra xwe de anîn: Yê ku tevî
şivanê keriyê wan ji behrê ve der-
xistine li ku derê ye? Yê ku Ruhê
xwe yî Pîroz xistiye nav wan li ku
derê ye? 12 Yê ku bazûyê mezin-
tiya xwe li rastê Mûsa dide meşîn,
bona ku ji xwe re navekî abadîn
biafirîne, ê ku li ber wan avan
qelişand, 13 wan di nava balû-
palan de rastî tilpekiyê neaniye û
mîna hespekî li çolê diçe derbas
kiriye, li ku derê ye? 14 Ruhê
XUDAN, mîna keriyê heywana ê
ku dakeve geliyê aramiyê da wan;
te, bona ku navekî xweşik ji xwe
re bikî, bi vî awayî rê nîşanî nete-
wa xwe da.

*Xwesteka Alîkarî û Dilovaniyê*

15 Ji ezmanan ve binihêre û ji
şunwarê pîrozî û mezinahiya xwe
bibîne! Xîret û hêza te li ku derê
ye? Bêrîkirina dilê te û dîlovani-
yên te, xwe ji min parastin! 16 Ji
ber ku Bavê me tu yî, ger Birahîm
bi me nezane û Îsraêl me nas neke
jî, tu, ya XUDAN, tu Bavê me yî;
ji destpêkê ve[1] Xelaskerê me navê
te ye! 17 Ya XUDAN, ma tu çima
me ji rêyên xwe şaş dikî û çima
bona ku em ji te netirsin, tu dilê
me hişk dikî? Bona qûlên xwe,

---

[1] Ji mêj ve.

bona nîjadên mêrasa xwe vegere!
18 Mêrasên wan di destê netewa
te yî pîroz de demekî kurt ma;
neyarên me perestgeha te eciqan-
din. 19 Em bûn mîna yên ku te tu
carî li ser wan serweriyê neajotiye
û navê te bi ser wan ve nehatiye
bang kirin.

64 Bona ku tu navê xwe bighî-
ne neyarên xwe û bila ne-
tewe ji bo te bilerizin, xwezîka
tu ezmanan biqelişîne û dakeve,
2 mîna qirşikên ku agir bi wan ke-
tine, mîna avên ku agir wan kelan-
dine, ji ber te bila çiya bilerizin!
3 Tu, dema te tiştên tirsehêz ên ku
em ne li benda wan bûn kir daket,
çiya ji ber te lerizîn! 4 Ji ber ku ji
demê kevin ve kes nebihîst û guh
nebihîst û çav xeynî te Xwedayekî
nedît, Xwedayek wusa ku, bona yê
li benda wî ne, dixebite. 5 Tu pêr-
gîniyê ji zilamê ku kêfxweş dibe û
rastiyê dike, yê ku di rêyên te de,
te di bîra xwe de tîne re dikî; a vay,
tu hêrs bû, me jî sûcan kirin, em ji
zû ve di nav wan de ne û bihêle em
xelas bibin! 6 Ji ber ku em gişt bûn
mîna mindarekî û hemû karên me
yî rast, mîna kincê gemarî ne û em
gişt mîna pel diçilmisin û fesadiyên
me, me mîna bayê digre û dibe.
7 Û yê ku bangî navê te bike, bona
ku xwe bisipêre te[1] xwe hişyar bike
nîne; ji ber ku te wecê xwe ji me
nuxumand û me bi destê fesadiyên
me ve qedand.
8 Û niha, ya XUDAN, tu Bavê
me yî; em herî ne û tu kûzvanê
me yî û em gişt karê destê te ne!
9 Ya XUDAN, zêde hêrs nebe û
abadîn fesadiyê di bîra xwe de
neyne; a vay, em li ber te dige-
rin, binêre, em gişt netewa te ne!
10 Bajarên te yî pîroz bûn çol, Si-
yon bû çol, Orşelîm bû wêranxa-
neyek! 11 Mala me yî pîroz û
xweşik ya bapîrên me di nava wê
de ji te re pesnê dikirin bi agir ve
şewitî û hemû cîhên ku me jê hez
dikirin, bûn xerabe. 12 Ma wusa
jî be, ya XUDAN, tuyê bi xwe
bigire? Ma tuyê bêdeng bimînî û
me zehf nizm bikî?

*Darazî û Xelasî*

65 Ez ji aliyê yên ku li min na-
pirsin ve hatim gerîn; ji ali-
yê yên ku li min nagerin ve hatim
dîtin; ji neteweyek bi navê min ve
nayê bang kirin re: Ez li vir im, ez
li vir im! gotim. 2 Ji netewa asê,
ya ku di rêya ne qenc e de, li pêy
ramanê xwe ve diçin re, di hemûya
rojê de destê xwe dirêj kirim; 3 ew
netewa ku, di baxçeyan de qur-
banan serjê dikin û li ser tûleyan
buxurê dişewitînin, bi vî awayî
her tim min hêrs dikin; 4 di nava
qebrên xwe de rûdinin û di cîhên
veşartî de şevê diborînin; goştê

1 An jî: Bona bi te bigire.

berazan dixwin û di feraxên wan
de ava goştên mekrûh hene; 5 ew
netewa ku: Li cîhê xwe bisekine,
nêzîkî min neyê, ji ber ku ez ji te
pîroztir im! dibêjin. Ew di pozê
min de duh, agirê ku di tûmiya rojê
de dişewite ne! 6 A vay, hatiye ni-
vîsandin û li ber min disekine: Ez
bêdeng nabim, lê belê ez ê berdêla
wê bidim, belê, ez ê bi sînga wan
ve bidim; 7 tevî fesadiyên we,
fesadiyên bapîrên we, XUDAN
dibêje, ew ku, li ser çiyayan buxurê
şewitandin û li ser giran ji min re
kufurê kirin; ji ber vêya, pêşiyê ez
ê karên wan bi pîvanê ve birijînim
paşla wan.
8 XUDAN wusa dibêje: Dema
di goşiyê de şîre bête dîtin, wekî
wê xera meke, ji ber ku bereket di
wê de ye! tête gotin, bona ku ez jî
hemû qûlên xwe helaq nekim, ez
ê di oxra wan de wusa bikim 9 û ji
Aqûp ve nîjadek û ji çiyayên xwe
re ji Cihûda ve mêrasxwurekî der-
xînim û yên ku bijartime, dê wê bi
mêrasî bistînin û dê li wir qûlên
min rûnin. 10 Û dê bona netewa
min ên ku li min geriyane, Şaron
ji keriyan re bibe hewşe û newala
Akor jî ji ganêran re bibe mexel.
11 Lê belê hûn, ên ku XUDAN
berdane, ên ku çiyayê minî pîroz
ji bîr kirine, ên ku ji pûtê Talî[1] re
sifrê danîne û ji pûtê Qismetê[2] re
xemra tevlihev dagirtine; 12 ez ê
jî we bikim qismeta şûr û hûn ê
gişt, bona serjêkirinê xwar bibin;
ji ber ku dema bang kirim, we
deng dernexistin; gava gotim, we
guhdarî nekirin; tenê tiştê ku di
çavê min de xerab e, we kirin û
tiştê ku jê hez nakim, we kirin.
13 Ji ber vêya Xudan, XUDAN
wusa dibêje: A vay, dê qûlên min
bixwin û hûn ê birçî bimînin; a
vay, dê qûlên min vexwin û hûn
ê tî bimînin; a vay, dê qûlên min
kêfxweş bibin û hûn ê fedî bikin;
14 a vay, qûlên min dê ji firehiya
dil bistirên û hûn ê ji jana dil bi-
qêrîn û ji ber şikestina dil biûrin.
15 Û hûn ê navên xwe di hundirê
naletê de ji yên ku bijartime re
bihêlin û dê Xudan, XUDAN te
bukuje û bi navekî din bangî qûlê
xwe bike; 16 wusa ku, zilamê ku
li dinê xwe pîroz daniye, dê bi
Xwedayê xwe yî heq re jî xwe
pîroz deyne û zilamê ku li dinê
sondê xwariye, dê bi Xwedayê
xwe yî heq re sondê bixwe; ji ber
ku tengasiyên berê hatin ji bîr ki-
rin û ji ber ku ji çavên min ve ha-
tin nuxumandin.

### *Erdê Nû û Ezmanê Nû*

2.Pêt 3,10-14; Pey 21,1-5

17 Ji ber ku a vay, ez ezmanên nû
û erdên nû diafirînim û dê bîranî-

[1] Bi Îbranîtî: Gad.

[2] Bi Îbranîtî: Menî.

na tiştên berê neyên kirin û neyên
ramanê. 18 Lê hûn ê bi afirandina
min ve kêfxweş bibin û abadîn bi
kêfxweşiyê ve bicoşin; ji ber ku
a vay, ez bi coşînê ve Orşelîmê û
bi kêfxweşiyê ve netewa wê di-
afirînim. 19 Û ez ê bi Orşelîmê
re kêfxweş bibim û bicoşim û bi
netewa xwe re kêfxweş bibim û
êdî dê di wê de dengê girî û dengê
feryadê neyên bihîstin. 20 Û dê
ne zarokê ku temena wî çend roj
e û ne jî zilamê kalepîr, ê ku rojên
xwe danegirtiye hebe; ji ber ku dê
zarok di sed saliya xwe de bimire
û yê ku sûcê kiriye, dê di sed sa-
liya xwe de bi nalet bête hesiban-
din. 21 Û dê xaniyan ava bikin û
rûnin û rezan deynin û mêwa wê
bixwin. 22 Dê ew ava bikin û wekî
din kes rûnenê; ji ber ku dê rojên
netewa min bibe mîna rojên darê û
yên ku bijartime, dê karên destên
xwe kevin bikin. 23 Dê li cîhê vala
keda xwe nedin û bona bêtariyê dê
zarokan neynin dinê; ji ber ku tevî
wan, yên ku ji wan derkevin, nî-
jada pîrozên XUDAN in. 24 Û dê
wusa bibe, berî ku ew bang bikin,
ez ê bersivê bidim û dema hîn ku
ew dibêjin ez ê bibihîzim! 25 Dê
berx û gur pev re biçêrin û şêr dê
mîna ga kayê bixwe; lê mar jî, dê
xwarina wî ax be. Dê di hemû çi-
yayê minî pîroz de xisarê nedin û
helaq nekin! XUDAN dibêje.

*Darazî û Hêvî*

66 XUDAN wusa dibêje:
Texta min ezman û ji
lingên min re pêlik erd in; ma
hûn ê xaniyekî çawa ji min re ava
bikin? Û ma cîhê rehetiya min ku
der e? 2 Ji ber ku destê min vana
hemûyan çêkirin û ew gişt bi xwe
wusa çêbûn. XUDAN dibêje: Lê
belê ez ji wî re, ji zebûn re û ji yê
ku ruhê wî şikestî û li zilamê ku
ji ber gotina min dilerize dinêrim.
3 Yê ku gayê serjê dike, mîna yê
ku zilam dikuje ye; yê ku ber-
xikê qurban dike, mîna yê ku
histuyê kûçikê dişkîne ye; yê ku
pêşkêşiya nan pêşkêş dike, mîna
yê ku xwîna beraz pêşkêş dike
ye; yê ku bi pêşkêşiya bîranînê
gunukê dişewitîne, mîna yê ku
pûtê pîroz dike ye. Belê, vana
rêya xwe bijartin û canê wan ji
tiştên wanî mekrûh hez dikin.
4 Ez ê jî asîwên wan hilbijêrim û
tiştê ku jê bêzar dibin, bi ser wan
ve bînim; ji ber, dema ku bang ki-
rim, yê ku bersivê bide tune bû;
gava gotim guhdarî nekirin û tiştê
ku di çavê min de xerab e, kirin û
tiştê ku jê hez nakim bijartin!
5 Yên ku ji gotina XUDAN ve
dilerizin, gotina wî guhdarî bikin!
Birayên we ên ku ji we dikerihin,
ji ber navê min we diqewirînin:
De bila XUDAN mezintiyê bi-
bîne ku, em kêfxweşiya we bi-
bînin! dibêjin; lê belê yên ku dê

werin şermezar kirin ew bi xwe
ne! 6 Ji bajêr ve gurmîniyek! Ji
perestgehê ve dengek! Ev dengê
XUDANê ku berdêla neyarên
xwe dide ye!
7 Bêyî êş kişandinê anî dinê[1]; berî
ku êşa wê were, lawekî anî dinê!
8 Ma kê tiştekî wusa bihîst? Ma
kê tiştên wusa dît? Ma welat di
rojekê de dizê? Neteweyek nişka
ve tê dinê? Ji ber ku Siyon, dema
jan pê girt, hema lawên xwe anî
dinê. 9 Ma gelo ez tînim cîhê
zayînê û bona zayînê quwetê
nadimê? XUDAN dibêje: Ma ez
bona zayînê quwetê bidim, ez ê
qet rehmê bigirim? Xwedayê te
dibêje.
10 Tevî Orşelîmê kêfxweş bi-
bin, hemûyên jê hez dikin,
hûn hemû bi kêfxweşiyê jê re
bicoşin; hemûyên ku bona wê
şînê dikişînin, hûn hemû bi wê re
şa bibin! 11 da ku, hûn ji pêsîrên
xemrevînên wê bimêjin û têr bi-
bin; da ku, hûn bimêjin û ji zêde-
yiya mezintiya wê zewqê bibînin!
12 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
A vay, ez aştiyê mîna çemekî, me-
zintiya neteweyan mîna lehiyek
ku ji ser xwe ve diçûye berdim
wê û hûn ê jê bimêjin; di himbêzê
de bên kişandin û di çongên wê
de hûn ê bên firikandin. 13 Mîna
zilamekî ku dayika wî, xemrevî-
niyê lê kiriye, ez ê xemrevîniyê li
we bikim û hûn ê li Orşelîmê bên
xemrevîn kirin! 14 Û hûn ê bi-
bînin û dê dilên we kêfxweş bibin
û hestiyên we, mîna gîhayek teze
hêşîn bibin. Û dê destê XUDAN,
li ser qûlên wî bête xuyanî bûn,
xezeba wî jî li ser neyarên wî bête
xuyanîbûn.
15 Ji ber, bona ku hêrsa xwe bi dij-
warî û pekandina xwe bi pêta agir ve
bide, dê XUDAN bi agir ve were û dê
erebeyên wî yên cengê mîna bahozê
bin. 16 Ji ber ku XUDAN, dê bona
hemû afirê bi agir û şûr ve daraziyê
bîne cîh û dê kuştiyên XUDAN zehf
bibin. 17 Yên ku bona herin bexçê
xwe paqij û pîroz dikin, di navê
de li paşî yekî, goştê berazê û tiştê
mekrûh û yên ku mişk dixwin,
dê gişt pev re biqedin; XUDAN
dibêje.
18 Ji ber ku ez bi kar û ramanên
wan dizanim; dema ku ez ê hemû
netewe û zimanan li cem hev bici-
vînim tê û dê werin û mezinahiya
min bibînin. 19 Û ez ê nîşanekê
deynim nav wan û yê ku ji ber
wan reviyane û xelas bûne bişînim
Tarşîşê, Pûlê û Lûdê, ji yên ku
kevanê dikişînin re, Tûbalê û Ya-
vanê, ez ê bişînim giraveyên dûr
ên ku nav û dengê min nebihîstine
û mezinahiya min nedîtine û dê
di nav gelan de mezinahiya min
bidin bihîstin. 20 Û ger lawên Îs-
raêl, di feraxa paqij de pêşkêşiyê

[1] Zayînê kir.

çawa bînin mala XUDAN, ew
ê jî ji hemû neteweyan ve hemû
birayên we bi hesp û erebeyan ve
û bi textêrewanan û bi qantiran û
bi hecînan, bi pêşkêşîbûnê bînin
çiyayê minî pîroz, Orşelîmê, XU-
DAN dibêje. 21 Û ez ê bi kahîn
û Lêwiyî bûnê ji wan ve bistînim,
XUDAN dibêje. 22 Ji ber, ez-
manên nû yên ku ez ê biafirînim
û erdê nû dê çawa li ber min bise-
kinin, dê nîjada we û navên we jî
wusa bisekinin, XUDAN dibêje.
23 Û dê wusa bibe ku, ji heyva nû
heta heyva nû û ji roja Sebtê, heta
roja Sebtê, hemû afir, bona peris-
tinê werin hizûra min, XUDAN
dibêje. 24 Û dê derkevin û dê li
laşên zilamên ku li dijî min guneh
kirine binêrin; ji ber ku kurmên
wan namire û agirên wan natefe
û dê bibin erjengên hemû afiran.

# YÊREMYA

*Pêşgtin*

Peyxamber Yêremya B.Z. di dawiya sedsala 7'an de û di serê sedsala 6'an de jiya. Di dema xizmeta xwe yî dirêj de gelê Xwedê îkaz kir, bêtariya mezin ya ku ji ber guneh û pûtperestiyê dê were serê wan ji berê ve têgîhand. Peyxam çawa bi cîh hat –Orşelîma ku dikeve destê Nebûkadnetsarê qiralê Babîlê, têkçûyîna bajar û perestgehê, tevî qiralê Cihûdayê gellek kes çawa çûne sirgûna Babîlê– dît. Têgîhand ku, dê gel ji sirgûnê vegere û bigihêje rewşa xwe yî kevin.

Mirov dikare pirtûka Yêremya li gor beşên li jêr in par bike:

1. Bangkirina Yêremya
2. Emirên ku di dema qiral Yoşiya, Yehoyakîm,Yehoyakîn û Tsedekiya de Xwedê daye gelê Cihûdayê
3. Bi nivîsên ku Barûkê Nivîskarê Yêremya berhev kirine; gotinên peyxamberî yên Yêremya û ji jiyana wî demên girîng
4. Belavokên Xwedê yên di derheqê gellek neteweyan de
5. Ketina Orşelîmê û sirgûniya gel ya Babîlê

Yêremya mirovekî gellek bihest (hîstiyar) bû. Ji gelê xwe hez dikir, lê ji têgîhandina bêtariyên ku dê werin serê gel hez nedikir. Di gellek beşan de tîne ziman ku, ji ber Xudan wî bi peyxamberî wezîfedar kiriye êşê dikişîne. Gotina Xwedê di dilê wî de mîna agir bû, nikarîbû wê bitefanda.

Di Pirtûkê de ayetên 31:31-34, bi hêviyê ve tijî ne. Dê rojek were ku Peymana Nû bête danîn (çêkirin). Dê rojek were ku bêyî hînkar, bêyî fermend gel gotina Xwedê bîne cîh. Ji ber ku dê gotina Xwedê li ser dilên wan ve bête nivîsandin.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-19 | Bangkirina Yêremya |
| 2:1-25:38 | Gotinên peyxamberî yên ku di dema qiral Yoşiya, Yehoyakîm,Yehoyakîn û Tsedekiya de hatine kirin |
| 26:1-45:5 | Bûyerên ku ji serê Yêremya derbas bûne |
| 46:1-51:64 | Daxuyaniyên di derbarê neteweyan de |
| 52:1-34 | Têkçûna (Ketina) Orşelîmê |

*Yêremya tête bangkirin*

1 Li warê Benyamînê, ji kahînên ku li Anatotê ne, gotinên Yêremyayê lawê Hîlkiya. 2 Di rojên Yoşiyayê lawê Amonê qiralê Cihûdayê de, di sêzdeh saliya qiraletiya wî de gotina XUDAN ji Yêremya re hat. 3 Û di rojên Yehoyakîmê lawê Yoşiyayê qiralê Cihûdayê de, heta dawiya yanzdeh saliya Tsedekiyayê lawê Yoşiyayê qiralê Cihûdayê de, di meha pêncemîn de heta roja ku birina Orşelîmê ya sirgûnê hat.

4 Û vê gotina XUDAN ji min re hat: 5 Berî ku di zikê dayikê de şikil bidim te, te nas kirim û berî ku tu bibe, te pîroz kirim; te ji neteweyan re kirim peyxamber. 6 Û min got: Ax, ya Xudan, XUDAN! A vay, ez nizanim gotin bibêjim; ji ber ku ciwan im! 7 Û XUDAN ji min re got: Nebêje ez ciwan im; ji ber ku ez te ji kê re bişînim tuyê here û her tiştên ku ji te re emir kirime tuyê bibêje! 8 Ji wan metirse! Ji ber bona ku te xelas bikim ez bi te re me, XUDAN dibêje. 9 Û XUDAN destê xwe dirêj kir û di devê min de da û XUDAN ji min re got: A vay, gotinên xwe xistim devê te; 10 binêre, îroj bona ji rehê ve rakirin û xerakirinê, bona helaq kirin û tune kirinê û bona ava kirin û çikandinê te danîm ser neteweyan û welatan.

11 Û gotina XUDAN, bi awahiya: Yêremya, tu çi dibînî? ji min re hat. Û gotim: Ez guliyekî bihîvê[1] dibînim. 12 Û XUDAN ji min re got: Te qenc dît; ji ber ez li ser gotina xwe, bona kirina wê hişyar[2] disekinim!

13 Û cara duwemîn gotina XUDAN ji min re bi awahiya: Tu çi dibînî? hat. Û gotim: Ez qazanekî dikele dibînim û wecê wê ji aliyê bakur e! 14 Û XUDAN ji min re got: Dê li ser hemûyên ku li welêt rûdinin, ji aliyê bakur ve asîw bi-

1 Bi Îbranîtî: Şaked. 2 Bi Îbranîtî: Şoked.

teqe. 15 Ji ber ku a vay, ez ê bangî
hemû eşîrên welatên aliyê bakur
bikim, XUDAN dibêje û dê werin
û li cîhê ketina deriyên Orşelîmê
û li hemberî dor û berên dîwarên
wê û li dijî hemû bajarên Cihû-
dayê, dê her yek textê xwe ava
bike. 16 Û ez ê ji ber hemû xe-
rabiyên wan li dijî wan daraziyên
xwe bibêjim, ji ber ku min ber-
dan û ji îlahên wekî din re buxurê
şewitandin û ji karên destên xwe
re peristinê kirin. 17 Û tu pişta
xwe bişidîne û rabe û her tiştê ku
ez ê ji te re emir bikim, ji wan re
bibêje; ji wan bêzar nebe, ya na ez
ê te li ber wan bêzar bikim. 18 Û
a vay, li dijî hemûya warê, li dijî
qiralên Cihûdayê, li dijî serokên
wan, li dijî kahînên wan û li dijî
netewa welêt, îroj te kirim bajarek
bi dîwar û sitûnek hesin û dîwarek
tûnc. 19 Û dê bi te re cengê bikin;
lê belê dê hêza wan qîmî te neke;
ji ber bona ku te xelas bikim ez bi
te re me, XUDAN dibêje!

*Xwedê Îsraêlê daraz dike*

2 Û gotina XUDAN bi awahiya:
Here û dema Orşelîm dibihîze
bang bike, ji min re hat: 2 XUDAN
wusa dibêje: Xêra te ya di ciwani-
ya te de, hezkirina te ya di bûkan-
tiya te de, li çolê, li warê ku neha-
tiye çandin ka çawa tu li pêy min
meşiyaye, bona te di bîra xwe de
anîm. 3 Îsraêl ji XUDAN re pîroz,
nûberê zadê wî bû; hemûyên ku
bi xwestana wê bixwin dê bisûc
bihata girtin, asîw bi ser wan ve
dihat, XUDAN dibêje.
4 Ya mala Aqûp û hemû eşîrên
mala Îsraêl, gotina XUDAN
guhdarî bikin! 5 XUDAN wusa
dibêje: Ma ka bapîrên we di min
de çi neheqiyê dîtin ku ji min ve
dûr ketin û li pêy valahiyê ve çûn
û vala bûn? 6 Û negotin: Ma XU-
DANê ku me ji warê Misirê ve
derxistiye, li çolê di warê şafir û
kortalan de, di warê ziwabûn û
siya mirinê de, di warê ku tu kes
jê derbas nabe û mirov tê de rûna-
nê de me meşandiye, li ku derê
ye? 7 Û bona ku hûn mêwa wê û
tiştê qenc bixwin we anîm warê
bi hilber; lê belê dema hûn ketin
wir, we warê min mindar kirin û
mêrasa min kirin tiştekî mekrûh!
8 Kahînan: Ka XUDAN li ku
derê ye? negotin û yên ku zagonê
di destê xwe de digirtin min nas
nekirin û şivanan li dijî min gu-
nehê kirin û peyxamberan bi Baal
re peyxambertiyê kirin û li pêy
tiştên ku fêde nade meşiyan.
9 Ji ber vê yekê ez ê hîn bi we
re bikevim keftûleftê, XUDAN
dibêje û ez ê bi lawên lawên we
re bikevim keftûleftê. 10 Ji ber
ku derbasî giraveyên Kîttimê bi-
bin û bibînin û bişînin Kedarê û
qenc fêhm bikin; hela tiştekî wusa
bûyiye, lê binêrin! 11 Ma qet tu

gel îlahên xwe guhertin? Lê ew jî
ne îlah in; lê belê netewa min me-
zintiya xwe bi tiştekî ku fêdê nade
re guhertin. 12 Ya ezmanno, hûn
jî bi vêya şaş bibin û ji tirsê bi-
lerizin, bi rastî jî bikevin şaşitiyê!
XUDAN dibêje. 13 Ji ber ku ne-
tewa min du xerabiyê kirin; dev ji
min, ji çavkaniya avên zindî ber-
dan û ji xwe re sarincan, sarincên
derizî yên ku avê nagirin kolan!
14 Ma Îsraêl qûl e? Dîlê ku li
malê bûye yî? Gelo çima bû malê
talanê? 15 Li ser wê şêrên ciwan
gurmiyan, dengên xwe dan bihîs-
tin û welatê wê talan kirin; ba-
jarên wan şewitîn, tu kesê ku lê
rûdinin neman. 16 Lawên Memfîs
û Tahpanhes jî serê te şikestandin.
17 Ma bi berdana Xwedayê xwe
XUDANê ku te di rê de dimeşand,
yê ku vêya li xwe kiriye ne tu yî?
18 Û niha bona vexwarina avên
Şîhorê[1] li rêya Misirê, çi karê te
heye? Û bona vexwarina avên
çemê Feratê di rêya Asûrê de çi
karê te heye? 19 Dê xerabiya te,
hişê te bîne serê te û te perwerde
bike û dê cebaniya te bi te bipe-
ke û bizanibe û bibîne ku, berda-
na te yî Xwedayê te XUDAN û
tunebûna tirsa te ya ji min tiştekî
xerab û bi jan e! Xudanê artêşan
XUDAN dibêje.
20 Ji ber ku te nîrê xwe ji dema
kevn ve şikestand û qeydên xwe
qetand; ez qûlitiyê nakim! got; ji
ber ku te li ser her girê bilind û di
bin her darê hêşîn de fahşetiyê kir,
raketî. 21 Û min te wekî mêwa
qenc, tova rast çandibû[2] û tu çawa
ji min re vegeriya û bû çemikên
qerase yên mêwên biyan! 22 Ji ber
ku ger tu bi ava xweliyê xwe bişo û
gellek sabûn bikarbîne jî dîsa fesa-
diya te li ber min gemarî disekine!
Xudan, XUDAN dibêje. 23 Ma tu
çawa dikarî bibêje ku: Ez mindar
nebûm, li pêy Baalan neçûme? Di
zozanê de li rêya xwe binêre û bi
zanîna xwe bizanibe; tu deveyeke
mê ya di rêyên xwe de digere û bi
lezî dimeşe yî[3]! 24 Tu kerê kûvî,
ê ku dema canê wî bikişîne hewê
bêhn dike û elimiye çolê yî; ma
dema bi hêrs be, kî dikare ku wî
bizivirîne? Hemûyên ku lê digerin
xwe nawestînin; dema meha wî
were, dê wî bibînin. 25 Ji pêxas
meşandinê lingên xwe û ji tîbûnê
qirika xwe biparêze. Lê belê te
got: Tiştê vala! Na! ji ber ku ji bi-
yanan hez kirim û ez ê li pêy wan
herim!
26 Dema diz bê girtin çawa
şermezar bibe, mala Îsraêl jî ew
bi xwe, qiralên wê, serokên wê
û tevî kahîn û peyxamberên wê

---

1 Çemê Nîlê.
2 Çikandibû.
3 An jî: Hecîneki, (cûreyekî deveyê ye, zehf rehwan e).

wusa şerm dikin; 27 ew ku, ji darê
re: Tu bavê min î û ji kevir re: Te
min anî dinê dibêjin; ji ber ku ne
wecê xwe, lê piştên xwe ji min re
zivirandin; lê belê dema asîw ji
wan re hat, dê: Rabe û me xelas
bike! bibêjin. 28 Ka îlahên ku te
ji xwe re çêkirine, li ku derê ne?
Dema asîw were serê te, ger bi-
karibin te xelas bikin, bila rabin!
Ji ber ku îlahên te, li gor hejmara
bajarên te ne, ya Cihûda!
29 Ma çima hûn bi min re
keftûleftê dikin? Li dijî min hûn
hemûyan, we guneh kirin, XU-
DAN dibêje. 30 Li valahiyê li
lawên we xistim; fêr nebûn; şûrê
we mîna şêrê ku helaq dike, pey-
xamberên we xwarin. 31 Ya hûn,
zarokên vê nifşeyê, bala xwe bidin
gotina XUDAN[1]! Ma ez ji Îsraêlê
re bûm çolek? An jî warekî reşe
tarî ye? Ma çima netewa min: Em
ji xwe re bûn efendî; êdî nayên
cem te dibêjin? 32 Ma qîzika ku
neçûye mêr xemlên xwe, bûk
piştika[2] xwe tu carî ji bîr dikin? Lê
belê netewa min di rojên bêhej-
mar de min ji bîr kirin. 33 Gelo
tuyê li pêy hezkirinê rêya xwe
çawa serrast bike! Ji ber vê yekê
te rêyên xwe heta hînî pîrekên xe-
rab jî kir. 34 Xwîna kesên bêsûc û
xizan jî di dawa te de ne; te wan di
dîwar qulkirinê de nedît; lê li dijî
hemû van tiştan bûn. 35 Lê wusa
bû jî, te got: Ez bêsûc im; rastî
hêrsa wî ji min zivirî! A vay, ez ê
bi te re bibim dozdar, ji ber ku tu:
Sûc nekirim! dibêjî. 36 Ma çima
tu bona rêya xwe buguherî wusa
tevgeriyayî diçe? Wekî te ji Asûr
şerm kiriye, tuyê ji Misirê jî şerm
bike! 37 Tuyê ji wir jî destên xwe
deyne ser serê xwe û derkeve; ji
ber ku XUDAN yên ku tu bi wan
ewle dibe ji xwe avêt û dê bi wan
re karê te qenc neçe!

*Îsraêla Nedilsozî*

3 Ger zilamek jina xwe berde
û ji cem biçe û bibe jina yekî
din, ew zilam gelo carekî din ve-
digere wê pîrekê? Gelo ew war
zehf mindar nabe? dibêjin; lê
belê te bi pirr leyîstikan fahşetiyê
kir, dîsa jî vegere min! XUDAN
dibêje. 2 Çavên xwe bilind bike
û li gireyên rût[3] binêre! Ma bi te
re li ku derê raneketin? Tu bona
wan, mîna bedewiyê çolê li qera-
xa rêyan rûnişt û bi zinayên xwe
û xerabiyên xwe ve warê mindar
kir! 3 Ji ber vê yekê pêya baranan
hate birrîn û barana dawîn nebû
û wecê te, wecê fahîşekî bû, te
şermbûnê nexwest. 4 Ji ber vê
yekê, gelo tuyê bi gotina: Bavo,

[1] An jî: Li gotina XUDAN binêrin!
[2] Şûtik.
[3] Beyarên tazî.

yê ku di civaniya min de rê nîşanî
min dida tu bû! bangî min neke?
5 Ma dê abadîn girr û kîn bigire?
Dê heta dawiyê bigire? A vay, te
wusa got. Û heta ku quweta te
gîhaşt, te xerabiyan kir!

*Îsraêla Ceban û Cihûda*

6 Û di rojên qiral Yoşiya de XU-
DAN ji min re got: Ma te tiştê Îs-
raêla ceban kiriye dît? Çû ser her
çiyayê bilind û bin her darê hêşîn
û li wir fahşetiyê kir! 7 Û paşî
ku wê vana hemûyan kirin, min
got: Ew ê şunda ji min re were,
lê belê şunda nehat; xwuşka wê
ya xayîn Cihûda jî vêya dît. 8 Û
dîtim ku Îsraêla ceban, ji ber ku
zinê kiriye, dema wê berdam û
kaxeza berdanê damê, xwuşka wê
ya xayîn Cihûda, dîsa netirsiya û
ew jî çû û fahşetiyê kir. 9 Û wusa
bû ku, bi şemateya zina kirina wê
war mindar bû û bi keviran û bi
dalîta daran ve zinê kir. 10 Û çawa
ku wusa ye, lê xwuşka wê Cihûda
ne ji dil, lê belê bi fenekiyê zivirî
min, XUDAN dibêje.
11 Û XUDAN ji min re got: Îsraêla
ceban daxuyanî kir ku ji Cihûdaya
xayîn salihtir e. 12 Here û van go-
tinên min berbi bakur ve bang bike
û bibêje: Ya Îsraêla ceban, vegere!
XUDAN dibêje: Ez ê bi xeyd li we
nenihêrim; ji ber ku ez bi dirûd im.
XUDAN dibêje, ez abadîn girr û
kînê nagirim. 13 Lê fesadiya xwe
binase, te li dijî Xwedayê xwe XU-
DAN gunehê kir û tu bi biyanan
re baz da wir ve û vir ve û di bin
her darê hêşîn de û we gotina min
guhdarî nekirin! XUDAN dibêje.
14 Ya lawên ceban, şunda vegerin,
XUDAN dibêje; ji ber ku efendi-
yê we ez im! Û ez ê wekî ji bajêr
yek û ji eşîrê dudu be, we rahêlim
û bînim Siyonê. 15 Û ez ê li gor
dilê xwe şivanan bidim we, dê we
bi zanîn û fêhmkariyê ve xwedî
bikin. 16 Û dê wusa bibe ku, dema
hûn li warê zêde bibin û bi hilber
bibin, di wan rojan de, XUDAN
dibêje, êdî dê: Sindoqa Peymanê
ya XUDAN neyê gotin û dê neyê
fikrê û dê wê di bîra xwe de ney-
nin û dê lê negerin û dê carekî din
nebe. 17 Wê gavê dê ji Orşelîmê re
bibêjin texta XUDAN û hemûyên
gelan, dê li wê, li navê XUDAN, li
Orşelîmê bicivin û dê êdî li pêy in-
yada dilên xwe yî xerab nemeşin.
18 Di wan rojan de dê mala Cihûda
tevî mala Îsraêlê bimeşe û ji warê
bakur dê pev re werin warê ku bi
mêrasî dayîme bapîrên we.
19 Lê belê min got: Binêre, ez ê
te çawa têxim nav lawan û warê
xweş, mêrasa xweşik ya artêşên
neteweyan bidim te! Û gotim: Hûn
ê bi navê Bav bangî min bikin û
ji pêy min venegerin. 20 Pîrekek
çawa xayîntiyê bi mêrê xwe re
bike û wî berde, bi rastî we jî bi vî
awayî xayintiyê bi min re kir û lê-

kebitîn, ya mala Îsraêl! XUDAN
dibêje. 21 Li ser girên tazî dengek
tête bihîstin, girîn û lavayên lawên
Îsraêl; ji ber ku rêyên xwe xwar
kirin, Xwedayê xwe XUDAN
ji bîr kirin. 22 Şunda vegerin ya
lawên ceban! Ez we ji cebaniya
we qenc bikim!
A vay, em ji te re hatin; ji ber
ku Xwedayê me XUDAN tu yî.
23 Bi rastî şemateya ji gir û çiya-
yan tê xapînokî ye; bi rastî xela-
siya Îsraêlê ji Xwedayê me XU-
DAN e! 24 Û ji ciwantiya me
de, tiştê şermezar keda bapîrên
me, keriyên wan û dewarên wan,
lawên wan û qîzên wan xwarin.
25 Em di şermezariya xwe de ra-
kevin û bila ruswatiya me ji me re
bibe rûber! Ji ber ku ji ciwantiya
me de heta îroj, em û bapîrên me,
li dijî Xwedayê xwe XUDAN sûc
kirin û me gotina Xwedayê xwe
XUDAN guhdarî nekirin!

4 Ya Îsraêl, ger tu vegere, XU-
DAN dibêje, ger tu ji min re
vegere û tiştên xwe yî mekrûh ji
ber min rake; wê demê tuyê be-
radayî negere 2 û tuyê bona heqê
XUDANê ku zindî ye, bi rasteqî-
niyê, dadiyê û rastiyê sondê bixwe
û dê neteweyan xwe bi XUDAN
re pîroz bikin û bi wî dê pesnên
xwe bidin!
3 Ji ber ku XUDAN ji mêrên
Cihûdayê re û ji Orşelîmê re wusa
dibêje: Erdên xwe yên nehatine
ajotin şûv bikin û di nav keleman
de neçînin! 4 Xwe bona XUDAN
sunet bikin û çermikê (sunetê yê)
dilê xwe bavêjin[1], ya hûn, mêrên
Cihûdayê û yên ku li Orşelîmê rû-
dinin; ya na ji ber xerabiya karên
we, dê hêrsa min mîna agirekî
derkeve û pêkeve û dê yê ku bite-
fîne tune be!

*Têkçûna ku dê ji Bakur ve were*

5 Li Cihûdayê bidin bang kirin û li
Orşelîmê bidin bihîstin û bibêjin:
Li welêt boriyê lêbixin! Bi dengê
bilind biqêrîn û bibêjin: Bicivin
ku em bikevin bajarên bi dîwar!
6 Berbi Siyonê alê rakin; bazdin û
penaber bibin, nesekinin! ji ber ku
ez ê ji bakur asîw û şikestandina
mezin bînim. 7 Şêr ji daristana
darên himbiz ve derket û ket rêya
ku gelan helaq dike; ji bo ba-
jarên te xera bibin, yê ku lê rûnê
nemînin, ji bo warê te wêran bike
ji cîhê xwe derket. 8 Ji ber vê yekê
cilikê[2] li xwe bikin, li xwe bixin û
biûrin; ji ber ku hêrsa XUDAN ya
sor ji me venegeriya! 9 Û dê ew roj
wusa bibe ku, XUDAN dibêje, dê
dilê qiral û dilên serokan biçikin û
dê kahîn şaş bibin û peyxamberan
şaş û mat mayî bibin.

[1] Xwe û dilê xwe, ji bona XUDAN sunet bikin!
[2] Yanê çûl.

10 Û gotim: Ax, ya Xudan, XU-
DAN! Te bi gotina: Dê ji we re
xweşî be, bi rastî pirr caran vê ne-
tewê û Orşelîmê xapandin; lê belê
şûr gîhaşt can!
11 Wê gavê dê ji vê netewê û
Orşelîmê re bête gotin: Dê ji cîhê
bilind û tazî yên çolê bayekî germ
berbi qîza neteweya min ve were,
ne bona ba kirina bênderê û ne
bona paqijbûnê; 12 dê bona min
bayekî ji vana xwurttir were; niha
ez ê jî ji wan re bi daraziyan bi-
bêjim! 13 A vay, mîna ewran der-
dikeve û erebeyên wî yên cengê
mîna bahozê; hespên wî ji qertelan
çalaktir in. Wey li serên me! Ji ber
ku em xera bûn. 14 Ya Orşelîm,
dilê xwe ji xerabiyê ve bişo ku, tu
xelas bibe! Ma ramanên te yên xe-
rab dê heta kengê di hundirê te de
bin? 15 Ji ber ku dengek ji Danê
digihîne û agahiyek xerab ji çiyayi-
ya Efrayîmê dide bihîstin. 16 Aga-
hiyê bigehînin neteweyan; a vay, li
dijî Orşelîmê bidin bihîstin, yên ku
dê dora wê bigirin ji welatekî dûr
ve tên û li dijî bajarên Cihûdayê
diqêrin. 17 Bi dor û ber yên ku li
dijî wê ne wekî yên li benda zevi-
yê ne, ji ber ku li dijî min bû asê,
XUDAN dibêje. 18 Yê ku vana bi
te dikin rêya te bi xwe û karên te
bi xwe ne; ev xerabiya te ye; rastî
tahl e, rastî digihêje dilê te.
19 Ya hundirê min, ya hundirê
min! Jan dilê min dişidîne! di hun-
dirê min de dilê min li hev dikeve;
ez nikarim bêdeng bibim! Ji ber
ku ya canê min, te dengê boriyê,
qêrîna cengê bihîst. 20 Agahiya
şikestin li ser şikestinê tê dayîn;
ji ber ku hemûya war wêran bû;
çadirê min, dawên çadira min di
demekê de wêran bû! 21 Ma ez
ê heta kengê alê bibînim, dengê
boriyê bibihîzim? 22 Ji ber ku ne-
tewa min bêaqil e, bi min nizane;
ew lawên dîwane ne û fêhmkariya
wan nîne; di kirina xerabiyê de bi
zanyar in, lê belê di qencî kirinê
de zanîna wan nîne.
23 Li erdê nihêrtim û a vay, tenha
û vala ye û li ezmanan nihêrtim
û tîrêjên wê tune bûn. 24 Li çi-
yayan nihêrtim, a vay, dilerizin û
hemû gir dihejiyan. 25 Nihêrtim û
a vay, zilam nîne û hemû civîkên
ezman reviyane. 26 Nihêrtim û a
vay, zeviya bi hilber bûye çolek û
hemû bajarên wê li ber XUDAN
û li hemberî hêrsa wî ya sor xera
bûne.
27 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Dê hemûya welêt wêran bibe; lê
ez ê bitûmî bitûmî neqedînim.
28 Ji ber vê yekê dê welat şînê bi-
gire û ezmanan ji jor ve reş bibin;
ji ber ku ez gotim, pêşniyarî ki-
rim û poşman nebûm û ez dev jê
bernadim. 29 Her bajar ji gurme
gurma siwaran û tîrvanan direve;
dikeve daristanên dar himbêz û bi
zinaran ve hildikişin û her bajar

hate berdan û kesî ku di wan de
rûnê nîne. 30 Û tu, gelo dema tu
xera bibe tuyê çi bikî? Tu erxe-
waniyê li xwe bike jî, ji xemlên
zêrînî xwe bixemilîne jî, çavên
xwe bi kilê mezin bike jî tuyê li
cîhê valahiyê xwe xweşik bikî;
evîndarên te, te biçûk dibînin, li
canê te digerin! 31 Ji ber ku den-
gekî bihîstim, wekî dengê pîreka
ku janê dikişîne, wekî tengasiya
ya ku yê pêşiyê tîne dinê, dengê
qîza Siyonê, bi gotina: Niha wey
li serê min! Ji ber ku li ber kesên
ku mêr dikujin canê min şewş
dibe, destê xwe vedike û hilmê
digire!

*Gunehê Orşelîmê*

5 Li kuçeyên Orşelîmê bigerin û
niha binêrin û fêhm bikin û li
qadê bigerin, ger hûn zilamekî bi-
bînin, ger yê ku dadmendiyê dike,
li rasteqîniyê digere hebe, ez ê lê
biborînim! 2 Û ger Bona heqê
XUDANê ku zindî ye! bibêjin jî,
dîsa jî bi fenekiyê sondê dixwin.
3 Ya XUDAN, ma çavên te ne li
ser rasteqîniyê ne? Te li wan xist,
lê belê nekesirîn; te wan qedand,
lê belê nexwestin ku dersê bigirin
û wecê xwe ji zinarê hişktir kirin;
nexwestin ku vegerin!
4 Û gotim: Bi rastî, vana xizan in,
bêaqil in; ji ber ku bi rêya XU-
DAN, bi zagona Xwedayê xwe
nizanin; 5 ez bi zilamên mezin ve
herim û ji wan re bibêjim; ji ber
ku ew bi rêya XUDAN û bi dadiya
Xwedayê xwe ve dizanin. Lê belê
wan gişt pev re nîr şikestandin û
qeydan qetandin. 6 Ji ber vê yekê
dê şêrek ji daristanê derkeve û wan
bikuje, dê gurê çolê wan biqelihîne,
dê li dijî bajarên wan piling hişyar
bimîne û bisekine; her zilamê ku ji
wir derkeve, dê bê perçiqandin; ji
ber ku gunehên wan zêde, cebani-
ya wan jî zêde bûn!
7 Ma ez çawa li te biborînim?
Lawên te dev ji min berdan û bi
yên ku ne îlah in re sondê dan.
Dema wan têr kirim zinê kirin
û bi liq liqî baz dan û çûn mala
fahîşeyan; 8 bûn bergîrê bere-
dayî; her yek ji jina cîranê xwe
re dişêhîn[1]. 9 Ma gelo ez ji ber vê
yekê sehêtiyê nakim? XUDAN
dibêje û gelo canê min ji gelekî
ûsa tolê hilnade?
10 Hilkişin ser dîwarên wan û xera
bikin; lê belê bitûmî bitûmî neqe-
dînin; zîlên wê jêbikin û bavêjin;
ji ber ku ew ne yên XUDAN in!
11 XUDAN dibêje: Ji ber ku mala
Îsraêl û mala Cihûda zehf xayîn-
tiyê bi min re kirin. 12 XUDAN
înkar kirin û gotin: Ne ew e; dê
xerabî bi ser me ve neyê; em ê şûr
û xela nebînin 13 û dê peyxamber
bibin ba û gotin ne di wan de ne,
dê ji wan re wusa bête kirin!

[1] Dihirin.

14 Ji ber vê yekê, Xwedayê artêşan
XUDAN wusa dibêje: Madem ku
hûn vê gotinê dibêjin, a vay, ez ê
gotinên xwe di devê te de bikim
agir, vê netewê jî bikim êzing.
15 A vay, ya mala Îsraêlê, ez ê ji
dûr ve neteweyekê bînim ser we,
XUDAN dibêje; ew neteweyek
kevin, neteweyek zordest e, nete-
weyek wusa ye ku, tu bi zimanê
wê nizanî û gotinên wê fêhm nakî.
16 Tîrdankên wan, gorekî vekirî
ye, giştik egîd in. 17 Nan û zadê
bêndera ku lawên te û qîzên te
bixwin, dê ew ê bixwin; dê kerî
û dewarên te ew ê bixwin; dê
mêwên te û darên te yî hêjîrê ew
ê bixwin; dê bi şûr ve li bajarên te
yî bi dîwar ên ku tu bi wan ewle yî
bixin. 18 Lê belê di wan rojan de
jî ez ê bitûmî bitûmî we neqedî-
nim, XUDAN dibêje.
19 Û dê wusa bibe ku, dema ew:
Çima Xwedayê me XUDAN
hemû van tiştan bi me kir? bi-
bêjin, tuyê ji wan re bibêje: We
çawa dev ji min berdane û di
welatê xwe de ji îlahên biyan re
qûlitiyê kiribin, hûn ê li welatekî
ne yên we ye ji biyanan re wusa
qûlitiyê bikin!
20 Di mala Aqûp de vêya bidin
bang kirin û li Cihûdayê wê bi-
din bihîstin û bibêjin: 21 Netewa
bêaqil û bê fêhmkarî ya ku çavên
wan hene û nabînin, guhên wan
hene û nabihîzin, niha vêya guh-
darî bikin: 22 Ma hûn ji min na-
tirsin? XUDAN dibêje; ma hûn
ê ji ber min nelerizin? Ez ku, bi
fermana abadîn wekî ji behrê re
bibe sînor, qûmê danîm û nika-
re wê derbas bibe û ger şepêlên
wê rabin jî nikarin bi ser bikevin
û bigurmin jî nikarin wê derbas
bibin. 23 Lê belê dilekî vê nete-
wê yê asê û bi inyad heye; bûn
asê û çûn. 24 Û di dilên xwe de:
Em niha ji Xwedayê xwe XU-
DANê ku baranê, barana pêşîn
û ya dawîn di wextên wan de
dide û heftayên eşkere ên demê
dasê bona me diparêze, bitirsin!
nabêjin. 25 Yên ku vana ji we zi-
virandine fesadiyên we û yê ku
qenciyê ji we diparêzîne sûcên
we ne. 26 Ji ber ku di nav nete-
weya min de zilamên xerab hene;
mîna ku civîkvan di kemînê de
radikevin, disekinin, dafikê da-
vên, zilam digirin. 27 Qefesek
bi civîka ve tijî çawa be, bi wî
avayî malên wan bi fenekiyê ve
tijî ne; ji ber vê yekê mezin bûn û
dewlemend bûn. 28 Qelew bûn,
dibiriqin; belê, di karê xerab de
ji ser xwe ve diçin; dozê, doza
sêwî nabînin ku karên wan rast
here[1]; qirara mafê xizanan jî na-
din. 29 Ji ber vana ma ez sehêtiyê
nakim? XUDAN dibêje, ma canê
min ji gelekî ûsa tolê hilnade?

1 Di rêya xwe de here.

30 Li welêt ji ser xwe ve çûyîn û
toqîn çêbû; 31 peyxamberan bi
fenekiyê peyxambertiyê dikin û
kahînan bi destên wan ve dibin
serwer; netewa min jî wusa hez
dike! Û gelo hûn ê li paşî vêya çi
bikin?

*Dor li Orşelîmê tê girtin*

6 Ya lawên Benyamîn, ji hundirê
Orşelîmê birevin û xwe bisi-
tirînin û li Tekoayê li boriyê bixin
û nîşanê bi ser Beyt-Hakkeremê
ve vekin; ji ber ku ji bakur asîw
û şikestandina mezin çavdêriyê
dikin! 2 Ez ê qîza Siyonê, qîzika
xweşik û nazik rakim û bavêjim.
3 Dê şivan û keriyên wî werin
wê; bi dor û berê li hembera wê
çadiran deynin; dê her kes li cîhê
xwe biçêrin. 4 Li dijî wê cengê
amade bikin! Rabin û em nîvrojkî
derkevin! Wey li serê me! Ji ber
ku roj zivirî, ji ber ku siyên êvarê
dirêj bûn. 5 Rabin ku em bi şev
derkevin û qesrên wê xera bikin!
6 Ji ber ku XUDANê artêşan
wusa dibêje: Dar jêbikin û li dijî
Orşelîmê meterîsê deynin! Bajarê
ku dê lê sehêtî kirin ew e; di hun-
dirê wê de xeynî xedariyê tu tişt
nîne. 7 Bîrek çawa avê biherikîne.
ew jî xerabiyê wusa diherikîne; li
wir zordestî û şelandin tête bihîs-
tin; li ber min her tim nexweşî
û birîn hene. 8 Ya Orşelîm, guh
bide îkazan, ya na canê min dê ji
te cihê bibe; ya na ez ê te bikim
wêraneyek, welatekî ku tê de
nayê rûniştin!
9 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Ji mêwê tiriyên dawîn çawa tête
hevdan, dê ji bermayiyên Îsraêlê
jî bi vî awayî bitûmî bitûmî bidin
hev; mîna yê rezan xera dike[1]
dîsa destê xwe bavêje selikan!
10 Ma bona ku ka bibihîzin ez ji
kê re bibêjim û ji kê re şahdeyiyê
bikim? A vay, guhên wan bêsunet
in û nikarin qenc guhdarî bikin; a
vay, gotina XUDAN bona wan
bû ruswaytî; jê hez nakin. 11 Ji
ber vê yekê, ez bi hêrsa XUDAN
ve tijî me; ji xwe sekinandinê ve
westiyam[2]; hemûyan pev re bi ser
zarokên li kûçê ne û li ser civa-
ka egîdan ve birijîne. Ji ber ku
dê mêr jî jin jî, tevî zilamên ku
pirr rojan jiyayî kalepîr jî bên bi
dest xistin. 12 Û dê tevî malên
wan zevî û jinên wan gişt pev re
ji kesên din re bên dayîn; ji ber ku
ez ê destê xwe ser yên ku li welêt
rûdinin ve dirêj bikim, XUDAN
dibêje. 13 Ji ber ku ji biçûk heta
mezin her yekê ji wan zebûnê qe-
zenca xerab û ji peyxamber heta
kahîn her yek fenekiyê dikin.
14 Û dema aşitî tunebû wan bi
gotina: Aşitî, aşitî! birîna qîza

1 Dide hev.

2 ...ji bi xwe girtinê ve westiyam.

netewa min ji ser ve baş kirin.
15 Gelo dema tiştê mekrûh kirin,
şerm kirin? Na, qet şerm nekirin,
bi sorbûnê jî nizanin[1]; ji ber vê
yekê dê ew jî di nav yên ku di-
kevin de bikevin; dema ez sehêti-
yê li wan bikim dê tilpekî bibin,
XUDAN dibêje.
16 XUDAN wusa dibêje: Li ser
rêyan bisekinin û qenc binêrin û
bi gotina: Ka rêya qenc li ku derê
ye? Rêyên kevin bipirsin û di wê
de bimeşin û hûn ê ji canên xwe re
aramiyê bibînin; lê belê: Em di wê
rêya de nameşin! gotin. 17 Û min,
bi gotina: Bi qencî dengê boriyê
guhdarî bikin! notirvanan danîm
ser we; lê belê: Em guhdarî nakin!
gotin. 18 Ji ber vê yekê, ya gelno,
yê ku bê serê wan guhdarî bikin, ya
civak tu jî fêhm bike! 19 Bibihîze
ya erd! A vay, ez asîwekê, hilbera
ramanên wê tînim ser vê netewê;
ji ber ku bi qencî gotinên min guh-
darî nekirin; lê zagona min jî, wê ji
xwe avêtin. 20 Ma çima ji min re
ji Şebayê gunuk û ji welatê dûr ve
qamirê bêhnxweş tê? Pêşkêşiyên
we yî şewitandinê ne meqbûl in û
ji min re qurbanên we ne xweş in.
21 Ji ber vê yekê XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê tilpekiyan dey-
nim ber vê netewê û dê law û bav
di wê de biçerixin û tilpekî bibin;
dê cîran tevî dostê xwe tune bibin.
22 XUDAN wusa dibêje: A vay,
ji warê bakurê ve neteweyek tê
û ji seriyên dinê neteweyek me-
zin serî hildide. 23 Kevan û tîrê
digirin destên xwe; bê însaf in û
heyfa wan jî nîne; dengên wan
mîna behrê dixurmin û li hespan
siwar dibin; mîna yek zilamekî
bin li dijî te ji cengê re rêz dibin,
ya qîza Siyonê! 24 Me agahiya
wê bihîstin; hîleta destên me qut
bûn; mîna pîreka ku diwelidîne êş
û acizî bi me girt. 25 Dernekeve
beyarê û di rê de nemeşe; ji ber
ku li dor û berê şûrê neyar û toqîn
hene! 26 Ya qîza netewa min, ci-
likan li xwe bike û di xweliyê de
bigevize; mîna şîna lawê xwe yî
tekane şînê bigire û bi jan li xwe
bixe! Ji ber ku yê xera dike dê
nişka ve bi ser me ve were.
27 Min te di nav netewa xwe de kir
bircek û bona ku tu bi rêyên wan
bizanibe û biceribîne, te kirim ceri-
bandinger. 28 Gişt zehf asê, zilamên
ku gotinê dikişînin û digerine ne;
tûnc in, hesin in; gişt xerabûyî ne.
29 Pifik her ku pifdike, pifdikê; agir
gullê qedand; li cîhê vala dihulînin
û disekinin; ji ber ku ji hundir ve
yên xerab naqetin. 30 Dê ji wan re
bibêjin zîvê ku bi kêr nayê, ji ber ku
XUDAN wan ji xwe avêt.

*Bi Perestgehê ve ewlebûn bêfêde ye*

7 Ji XUDAN ve ev gotin ji
Yêremya re hat: 2 Li deriyê

---
1 Sorbûn ka çi ye pê nizanin.

mala XUDAN bisekine û li wir
vê gotinê bang bike û bibêje: Ya
hemûya Cihûda, yên ku bona ji
XUDAN re peristinê bikin ji van
deriyan ve dikevin hundir, gotina
XUDAN guhdarî bikin! 3 Xwe-
dayê Îsraêl, XUDANê artêşan,
wusa dibêje: Rêyên xwe û karên
xwe baş bikin û ez ê we li vî cîhî
bidim rûniştandin! 4 Bi gotinên
derewîn ên ku dibêjin Perestgeha
XUDAN, Perestgeha XUDAN,
Perestgeha XUDAN ev in ve
ewle nebin! 5 Ji ber ku ger hûn
rêyên xwe û karên xwe baş ser-
rast bikin, di navbera zilamekî û
cîranê wî de bitûmî dadiyê bikin,
6 ger hûn neheqiyê ji yê xerîb re,
ji yê sêwî û yê bî re nekin û li vê
derê xwîna bêsûc nerijînin û wekî
ku li xesariya we be, li pêy îlahên
wekî din ve nemeşin, 7 wê gavê li
vê derê, li warê ku ji bêpêşîbûnê
heta abadînê dayîme bapîrên we
re ez ê we bidim rûniştandin.
8 A vay, hûn bi derewên bêfêde
ve ewle dibin! 9 Dizî kirin, zilam
kuştin û zina kirin û bi derewî
sond xwarin û ji Baal re buxur
vêxistin û li pêy îlahên ku hûn bi
wan nizanin meşiyan! 10 Bona
kirina hemû van karên mekrûh
jî tên li vê mala ku bi navê min
ve tête bang kirin, li ber min dise-
kinin û em xelasbûn! dibêjin, ne
wusa? 11 Ma vî xaniyê ku bi navê
min ve tête bang kirin di çavê we
de bû qula rêbiran? A vay, min,
min jî dît, XUDAN dibêje.
12 Lê belê niha, herin cîhê minî
Şîloyê ê ku berê navê xwe lê bicîh
kirime û ka bibînin ji ber kirinên
xerab yê netewa xwe Îsraêlê, çi
bi wê re kirime! 13 Û, niha, ma-
dem ku we hemû van karan kirin,
XUDAN dibêje, çawa ku min jî
bi lezî kir û ji we re gotim, lê belê
we guhdarî nekirin û çawa ku
bangî we kirim, lê belê we ber-
sivê nedan; 14 ji ber vê yekê, li
Şîloyê çi kiribim, ez ê li vî xaniyê
ku bi navê min ve tête bang ki-
rin, ê ku hûn pê ewle dibin û li vî
cîhê ku dame bapîrên we jî wusa
bikim. 15 Û çawa hemû birayên
we, hemûya nîjada Efrayîm avêti-
bim, ez ê we jî wusa ji ber xwe ve
bavêjim!
16 Û tu bona vê neteweyê lava neke
û bona wan hewîn û dua neke û li
ber min mehderiyê neke; ji ber ku ez
ê te guhdarî nekim! 17 Ma tu nabînî
li bajarên Cihûdayê û li kuçeyên
Orşelîmê ew çi dikin? 18 Bona ku
min hêrs bikin, ji bo ji qiralîçeya
ezmanan re pîdeyan çêbikin û bona
ji îlahên wekî din re pêşkêşiyên ri-
jandinê birijînin, law êzingan didin
hev, bav agir vêdixin û pîrek hevîr
disitirin. 19 Ma ew min diêşînin?
XUDAN dibêje: ma bona şerma
wecê xwe, xwe naêşînin? 20 Ji ber
vê yekê Xudan, XUDAN wusa
dibêje: A vay, dê bi ser vî cîhî ve,

li ser mirovan û li ser heywanan û
li ser darên beyarê û li ser hilberê
erdê, dê hêrs û xeyda min birije û
dê pêkeve û venemire!
21 Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: Pêşkêşiyên
xwe yî şewitandinê tevî qurbanê
xwe bikin ku hûn jî goşt bixwin!
22 Ji ber ku roja bapîrên we ji
warê Misirê ve derxistim, bona
pêşkêşiya şewitandinê û qurbanê
ji wan re negotim û emir nedam
wan; 23 lê vêya ji wan re emir ki-
rim û gotim: Gotina min guhdarî
bikin û ez ê ji we re bibim Xwedê
û hûn ê jî ji min re bibin netewe
û di her rêya ji we re emir dikim
de bimeşin ku, bila ji we re bibe
qencî! 24 Lê belê guhdarî nekirin
û guh nedanê, lê di şîretên xwe de
û di inyadiya dilê xwe yî xerab de
meşiyan û ne pêş ve, lê belê paş
ve çûn. 25 Cergî ji rojên bapîrên
we ji warê Misirê ve derketine
heta îroj bi lezkirin û şandinê,
hemû qûlên xwe, peyxamberan
ji we re şandim 26 û min guhdarî
nekirin û guh nedan min û histuyê
xwe hişk kirin; ya ku ji ya bapîrên
xwe xerabtir e kirin.
27 Û tuyê hemû van gotinan ji
wan re bibêje; lê belê dê te guh-
darî nekin û tuyê bangî wan bike,
lê belê dê bersivê nedin te. 28 Û
tuyê ji wan re bibêje: Netewa ku
gotina Xwedayê xwe XUDAN
guhdarî nakin û fêr nabin ew e:
rasteqînî tune bû û ji devên wan
ve qut bû!

*Gunehên ku di Newala Ben-Hînnomê de hatine kirin*

29 Ya Orşelîm, porê xwe jêbike
û bavêje û li ser girên tazî lawijan
bixwîne! Ji ber ku XUDAN nete-
wa jê xezebê dikir ji xwe avêt û
berda. 30 Ji ber ku lawên Cihûda
ya ku di çavê min de xerab e kirin,
XUDAN dibêje; bona xaniyê ku
bi navê min ve tê bang kirin min-
dar bikin, tiştên xwe yî mekrûh
xistin wê. 31 Û bona lawên xwe û
qîzên xwe di agir de bişewitînin,
li Tofeta ku di Newala Ben-Hîn-
nomê yî de cîhên xwe yî bilind
ava kirin; emrê vêya min neda, ji
hişê min jî derbas nebû. 32 Ji ber
vê yekê, a vay, XUDAN dibêje:
Roj tên ku, êdî dê ji wir re ne To-
fet û çemê lawê Hînnom, lê belê
dê çemê Serjêkirinê bête gotin û
heta ku cîh nemîne, dê li Tofetê
binax bikin. 33 Û dê laşên vê ne-
teweyê ji cenawirên erdê re û ji
civîkên ezmana re bibin xwarin û
kesî ku wan bitirsîne dê tune be.
34 Û ez ê ji bajarên Cihûda û ji
kuçeyên Orşelîmê dawiya dengê
kêfxweşiyê û dengê şabûnê û
dengê zava û dengê bûkê bînim;
ji ber ku dê war xera bibe!

8 XUDAN dibêje: Dê wê gavê
hestiyên qiralên Cihûdayê û

hestiyên serokên wan û hestiyên
kahînên wan û hestiyên peyxam-
berên wan û hestiyên kesên ku li
Orşelîmê rûniştine, ji gorên wan
ve derxînin 2 û dê wan li ber rojê
û li ber heyvê û li ber hemû artêşa
ezmanan, ên ku ji wan hez dikirin
û qûlitiyê ji wan re dikirin û li pêy
wan dimeşiyan û li wan digeriyan
û peristinê ji wan re dikirin re ra-
xin; dê nedin hev û neyên binax
kirin, dê li wecê axê de bibin zi-
bil! 3 Û hemûya maweya ku ji ber
vê eşîra xerab ve mayî ye, li hemû
cîhên ku wan sirgûn kirime yên
ji ber mayîne, dê ji zindîbûnê zê-
detir mirinê hilbijêrin. XUDANê
artêşan dibêje.

*Guneh û Ceza*

4 Û tuyê ji wan re bibêje: XUDAN
wusa dibêje: Ma mirov bikeve
dê ranabe? Mirov çewt dibe û
şunda nayê? 5 Ma çima ev netewa
Orşelîmê her tim bi cebaniyê dizi-
vire? Bi fenekiyê ve dizeliqe, na-
xwaze şunda vegere! 6 Baş guh-
darî kirim û bihîstim. rast negotin
bi gotina: Çi kirim? tu kes ji xe-
rabiya xwe ve tobe nake: her yek
mîna hespên ku bona cengê dite-
qizin, vedigerin reva xwe. 7 Belê.
leglega li ezmanan wextên xwe yî
eşkere dizane û qumrî û pereselkê
û quling çavdêriyê li wexta hatina
xwe dikin; tenê netewa min bi da-
raziya XUDAN nizane!
8 Ma çawa hûn dibêjin: Em bi
zanyar in û zagona XUDAN di
me de ye? Lê belê a vay, pênûska
derewîn ya nivîskaran derewê rêz
kir! 9 Zilamên bi zanyar şerm ki-
rin, bêzar bûn û bi dest ve ketin; a
vay, ew gotina XUDAN ji xwe ve
avêtin û ma çiyî zanyariyê di wan
de heye? 10 Ji ber vê yekê ez ê jin-
ên wan bidim kesên din, zeviyên
wan jî bidim yên ku wan ji xwe re
bikin milk; ji ber ku ji biçûk heta
mezinên wan zebûnê qezanca xe-
rab in; ji peyxamber heta kahîn
her yekê ji wan derewan rêz dikin.
11 Û dema xweşî tunebû wan bi
gotina: Xweşî, xweşî! birîna qîza
netewa min ji ser ve qenc kirin.
12 Gelo dema tiştê mekrûh kirin,
şerm kirin? Na, qet şerm nekirin,
bi sorbûnê çî ye jî nizanin; ji ber
vê yekê ew ê jî bikevin nav yên
ku ketine: dema li wan sehêtî bête
kirin dê tilpekî bibin! XUDAN
dibêje. 13 Ez ê wan bitûmî bitûmî
biqedînim. XUDAN dibêje: dê di
mêw de tirî tune be û dê di darê
hêjîrê de hêjîr tune be. dê pel jî
biçilmise û tiştên ku dame wan dê
ji wan herin!
14 Ma çima em li cîhê xwe rû-
dinin? Bicivin ku em bikevin
bajarên bidîwar û li wir bêdeng
bibin! ji ber ku Xwedayê me XU-
DAN me bêdeng kir û ava ziravikê
bi me re da vexwarin. ji ber ku me
li dijî XUDAN sûc kirin. 15 Em li

benda xweşiyê man, lê belê qencî
nehat û em li benda wexta şîfayê
man û a vay, bêzarî! 16 Xorîna
hespan ji Danê ve tête bihîstin; ji
hêrîna hespên bihêz hemû welat
dilerize; ji ber ku ew hatin û warê
û hemûyên ku di hundirê wê de ne,
bajêr û yên ku tê de rûdinin, xwa-
rin û qedandin. 17 Ji ber ku a vay,
ez mar û margîskên ku li wan sêhr
nayên kirin bişînim nav we û dê bi
we vedin! XUDAN dibêje.
18 Ger ez bikarîbûma li dijî keserê
xemrevîntiyê li xwe bikirama! Di
hundirê min de dilê min şewş dibe.
19 A vay, ji warekî zehf dûr ve fer-
yada qîza netewa min: Ma XU-
DAN ne li Siyonê ye? Qiralê wî
ne li wir e? Ma çima bi pûtên xwe
yî qewartî û bi tiştên xwe yî biyan
û vala min hêrs kirin? 20 Dema
dasê derbas bû, havîn gîhaşt dawi-
yê û em xelas nebûn! 21 Ez ji ber
birîna qîza netewa xwe birîndar
bûm, reşan li xwe kirim; şaşitiyê
bi min ve girt. 22 Ma li Gîleadê
merhem nîne? Li wir hekîm nîne?
Wê gavê gelo çima qîza netewa
min nehat qenc kirin?

9 Xwezîka, bila serê min çavka-
niya avan û çavên min çavka-
niya hêstiran biba ku, ez ji kuştiyên
qîza neteweya xwe re şev û roj bi-
giriyama! 2 Xwezîka ji min re li
çolê qonaxek rêwiya hebûba ku,
min dev ji netewa xwe berda û ez
ji cem wan biçûma! Ji ber ku ew
gişt zinêkir, henga xayînan! 3 Û
wekî tîrên wan bin, zimanên xwe
bona derewan divenînin û li welêt
xwûrt bûn, lê ne bona rasteqîniyê;
ji ber ku ji xerabiyê derbasî xera-
biyê dibin û min nas nakin, XU-
DAN dibêje. 4 Bila her kes xwe
ji cîranê xwe ve biparêze û bi tu
birayî re ewle nebin; ji ber ku her
bira dê zehf bixapîne û her cîran
gotinê bikşîne û bigerîne. 5 Û dê
her kes cîranê xwe bixapîne û dê
rastiyê nebêjin; derew gotinê hînî
zimanê xwe kirin; bona fesadî ki-
rinê diwestin. 6 Cîhê ku tu lê rû-
dinî, di navbera fenekiyê de ye; ji
ber fenekiyê naxwazin ku min nas
bikin! XUDAN dibêje.
7 Ji ber vê yekê XUDANê artêşan
wusa dibêje: A vay, ez ê wan bu-
hulînim û ez ê wan biceribînim; ji
ber ku, ma ji ber qîza netewa xwe
min ê hîn çawa bikira? 8 Zimanên
wan tîrekî ku dukuje; fenekiyê
dibêje; bi devê xwe ve ji cîranê
xwe re xweşî dibêje û di hundirê
xwe de kemînê jê re datîne. 9 Ji
ber vê yekê ma ez ê sehêtiyê li wan
nekim? XUDAN dibêje; ma canê
min ji gelekî ûsa tolê hilnade?
10 Ez ê bona çiyayan bigrîm û
fixanê bikim û ez ê bona çêre-
gehên çolê lawijan bixwînim, ji
ber ku şewitîn, tu kes derbas nabe
û dengê keriyan nayê bihîstin; ci-
vîkên ezmanê jî cenawiran jî re-

viyan û çûn. 11 Û ez ê Orşelîmê
bikim komên keviran û cîhê çe-
qelan û bajarên Cihûda jî ez ê
bikim wêraneyek ku tu kes tê de
rûnanê.
12 Ma kî ye ew zilamê bi zanyar
ku bila vêya fêhm bike? Û ew
zilam kî ye ku, bona ku bighîne
devê XUDAN jê re gotiye? Çima
welat tune bû, mîna çolê şewitî, tu
kes derbas nabe? 13 Û XUDAN
dibêje: Madem ku dev ji zago-
na min, ya ku danîbûm ber wan
berdan û bi guhdarî kirina gotina
min tê de nemeşiyan 14 û li pêy
inyada dilên xwe û li pêy Baalên
ku bapîrên wan hînî wan kiribû
meşiyan; 15 ji ber vê yekê Xwe-
dayê Îsraêlê, XUDANê artêşan
wusa dibêje: A vay, ez ê ji wan re,
ji vê netewê re gîhayê tahl[1] bidim
xwarin û ez ê ava ziravikê bi wan
re bidim vexwarin. 16 Û ez ê wan
di nav neteweyên ku ne wan û ne
jî bapîrên wan pê nizanin de belav
bikim û heta ku ez wan biqedînim,
ez ê şûr ji pêy wan ve bişînim.
17 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Qenc bifikirin û bangî pîrekên di-
girîn bikin ku bila werin û pîrekên
bi huner jî bînin ku bila werin
18 û bila bilezînin û bona me
fixanê bikin ku çavên me hêstiran
birijînin û bila pêlûyên me avan
birijînin! 19 Ji ber ku ji Siyonê
dengê fixanê tête bihîstin: Em
çawa helaq bûn! Zehf şermezar
bûn, ji ber ku me dev ji welat
berdan, ji ber ku welatên me xera
kirin! 20 Lê belê ya pîrekno, go-
tina XUDAN guhdarî bikin û bila
guhên we gotina devê wî bigirin û
fixanê hînî qîzên xwe bikin, bila
her kes jî lawijê hînî cîranê xwe
bike. 21 Ji ber bona ku ji kuçan
zarokan, ji qadan egîdan bibirin
û bavêjin,-mirin bi şivakê me ve
hilkişiya, ket qesrên me. 22 Bi-
bêje: XUDAN wusa dibêje: Laşê
mirovan li rûyê beyarê mîna zi-
bilê û mîna demetê ku li pêy das-
van dikevin, dê bikevin û kesî ku
bide hev dê tune be.
23 XUDAN wusa dibêje: Bila
zilamê bi zanyar, bi zanyariya
xwe ve pesnê xwe nede û bila
egîd bi hêza xwe ve pesnê xwe
nede, bila zilamê dewlemend bi
dewlemendiya xwe ve pesnê xwe
nede; 24 tenê yê pesnê xwe dide
bila bi vêya, bi fêhmkarîbûnê û bi
zanîbûna yê ku li dinê bi xêr, dadî
û rastiyê dike, XUDAN ez im ve
pesnê xwe bide! Ji ber ku ez ji
vana hez dikim, XUDAN dibêje.
25 A vay, XUDAN dibêje: Ro-
jên ku ez ê sehêtiyê li hemûyên
bisunet di bêsunetbûnê wan de,
26 Misirê û Cihûdayê û Edomê
û lawên Ammon û Moabê û
hemûyên li çolê rûdinin û serê
rîhên wan jêkirîne re bikim tên: ji

[1] Gîhayê pêlinê, vermût.

ber ku hemûya van netewan bêsunet in û hemûya mala Îsraêlê jî di dil de bêsunet in.

*Xwedayê Zindî û Pûtên mirî*

Îşa 40,18-26; Zeb 115,3-8

10 Gotina ku XUDAN ji we re dibêje guhdarî bikin, ya mala Îsraêl! 2 XUDAN wusa dibêje: Hînî rêyên neteweyan nebin û ji nîşanên ezman ve bêzar nebin; ji ber ku netewe ji wan bêzar dibin! 3 Ji ber ku kevneşopên neteweyan tiştê vala ne; ji ber ku dar ji daristanê ve jêdikin, bi bivir karê destê hoste ye. 4 Bi zîv û zêr ve wê dixemilînin; bi bizmar û çakûçan wê dizeximînin, ku ji cîhê xwe ve tev nebe. 5 Karê tornekar, mîna darê xurmê ne û nikarin gotinê bibêjin; hewce kirina kişandina wan hene; ji ber ku nikarin bimeşin. Ji wan netirsin; ji ber ku nikare xerabiyê bike, di wan de qencî jî nîne!

6 Mîna te nîne, ya XUDAN; tu mezin î û di hêzê de navê te mezin e! 7 Ya qiralê netewan, ma kî ji te natirse? Ji ber ku li te tê; di nav hemû zilamên bi zanyar yên neteweyan de û di hemû welatan de mîna te nîne. 8 Û gişt pev re bûn xêvik û bêaqil; perwerda pûtan: Ew êzing in[1]! 9 Ji Tarşîşê lewhên zîv ên hatine kutandin û ji Ûfazê zêr tête anîn, karê destê hoste û zêrînger e; lacîwerd û erxewanî bona kincê wan e; gişt karê destê bi huner in. 10 Lê belê XUDAN Xwedayê heq e, Xwedayê ku zindî ye û Qiralê abadîn ew e; ji hêrsa wî dinya dilerize û li ber xezeba wî netewe nikarin bisekinin. 11 Hûn ê ji wan re wusa bibêjin: Îlahên ku ezmanan û erdê neafirandine, dê ew ji erdê û ji bin ezmanan tune bibin!

12 Erdê bi hêza xwe ve afirand, dinê bi zanyariya xwe zeximand û ezmanan bi fêhmkariya xwe ve raxist. 13 Dema ew deng bide li ezmanan av dixuşên û ji nîçikên erdê duh bilind dike; bona baranan birûskan çêdike û ji xezîneyên xwe ve ba derdixîne. 14 Her kes bû ehmeq û nezan; dê her zêrînger ji ber pûtê xwe yî qewartî şermezar bibe; ji ber ku pûtê wî yê rijandî derew e û di wan de hilm nîne. 15 Ew tiştên vala ne; tiştê vala yê gumreşî ye; dema sehêtî li wan ve bête kirin, dê tune bibin. 16 Para Aqûp ne mîna wan e; ji ber ku yê şiklê dide her tiştî ew e; ezbeta mêrasa wî jî Îsraêl e; navê wî. XUDANê artêşan e.

*Tengasî tê*

17 Ya tu, yê ku di hundirê bircê de rûdinê, buxçika xwe ji erdê ve bide hev! 18 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje: A vay, ez îcar yên ku li welêt rûdinin bi qûsik ve ba-

1 Dar, an jî: Dalitek e.

vêjim û wan têxim tengasiyê ku
bila bibihîzin.
19 Ji ber birîna min wey li serê
min! Birîna min jan dide; lê belê
ez gotim: Bi rastî ev derdê min e
û divê ez lê deyax bikim. 20 Çadi-
ra min xera bû û hemû benên min
qetiyan; zarokên min ji cem min
ve derketin û ew tune ne; êdî yê
ku çadira min bişidîne û dawên wê
lêkin nîne. 21 Ji ber ku şivan bûn
xêvik û li XUDAN negeriyan; ji
ber vê yekê karên wan qenc neçûn
û hemû keriyên wan belav bûn.
22 Bi gotina, guhdar be! a vay, tê,
gotinek heye û bona bajarên Cihû-
dayê wêran bike, bike cîhê çeqel ji
warê bakur ve lerizîna mezin.

*Duaya Yêremya*

23Ya XUDAN, dizanim ku, rêya
mirov ne di destê wî de ye; gavên
xwe rastkirin, ne di destê mirovê
ku dimeşe de ye. 24 Ya XUDAN,
min ne bi hêrsa xwe, bi pîvanê ve
perwerde û aş bike, ya na tuyê min
daxîne nînbûnê! 25 Hêrsa xwe bi
ser neteweyên ku bi te nizanin û
bi ser eşîrên ku bangî navê te na-
kin ve birijîne! ji ber ku wan Aqûp
xwarin, belê, wî xwarin û qedan-
din û welatê wî wêran kirin!

*Peyman xera bû*
2.Dîr 34,29-33

11 Ji XUDAN ev gotin ji
Yêremya re hat: 2 Gotinên
vê peymanê bibihîzin û ji zi-
lamên Cihûdayê re û ji yên ku li
Orşelîmê rûdinin re bibêjin! 3 Û
tu ji wan re bibêje: Xwedayê Îs-
raêlê XUDAN wusa dibêje: Yê ku
gotina vê peymanê guhdarî neke,
bila bi nalet be! 4 Ew peymana
ku roja bapîrên we ji warê Misirê,
ji ocaxa hesin ve derxistim emir
dam wan û gotim: 5 Bona warê
ku jê şîr û hungiv diherike wekî
îroj ji bo bidim wan, ji bo sonda
ku ji bapîrên we re dayîme bizex-
mînim, gotina min guhdarî bikin
ku li gor her tiştên ku ji we re emir
kirime wan çêbikin; bi vî awayî
hûn ê ji min re bibin netewe, ez ê
jî ji we re bibim Xwedê. Û bersivê
dam û: Amîn, ya XUDAN! gotim.
6 Û XUDAN ji min re got:
Giştikên van gotinan li bajarên
Cihûda û li kuçeyên Orşelîmê
bang bike û bibêje: Gotinên vê
peymanê bibihîzin û wan bikin!
7 Ji ber ku ji roja ku lez kirim û
bi gotina: Gotina min guhdarî
bikin! şahdeyî kirinê bapîrên we ji
warê Misirê derxistime heta îroj,
bi quwet şahdeyiyê li wan kirim.
8 Lê belê guhdarî nekirin û guh
nedan û gişt di inyada dilên xwe
yî xerab de meşiyan; min jî hemû
gotinên vê peymanê bi ser wan ve
anî, ew peymana ku, bona bikin
emir kirim, lê belê nekirin.
9 Û XUDAN ji min re got:
Xayîntiya mêrên Cihûdayê û ya

yên ku li Orşelîmê rûdinin der-
ket holê. 10 Vegeriyan fesadiya
bapîrên xwe ên ku nedixwestin
gotinên min guhdarî bikin û bona
ji îlahên wekî din re qûlitiyê bikin
li pêy wan çûn; mala Îsraêl û
mala Cihûda, peymana min ya ku
bi bapîrên wan re birrîbûm xera
kirin! 11 Ji ber vê yekê XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê xerabi-
yekê ji wan re bînim ku, dê nika-
ribin jê derkevin û dê feryadê ji
min re bikin û ez ê wan guhdarî
nekim. 12 Wê gavê yên ku li
bajarên Cihûdayê û li Orşelîmê
rûdinin, dê herin û ji îlahên ku
ji wan re buxurê vêxistibûn re
feryadê bikin û dema asîw bê
serê wan, dê qet wan xelas nekin.
13 Ji ber ku îlahên te li gor hej-
marên bajarên te ne, ya Cihû-
da û we li gor hejmara kuçe-
yên Orşelîmê ew pêşkêşîgehên
şermezar, ji bo ku ji Baalê re
buxurê bişewitînin pêşkêşîgehan
çikandin[1]!
14 Û tu, bona vê netewê lava neke
û bona wan dua û hewînê nexwa-
ze; ji ber ku dema ji ber tengasiya
xwe bangî min bikin, ez ê wan
guhdarî nekim. 15 Ma çi karê evî-
na min li mala min heye? Madem
ku bi gellekan re lîstokiyê kiriye û
goştê[2] ku hatiye pîroz kirin ji te ve
derbas bû; dema xerabî bikar bê
tu bi dilxweşiyê dicoşe. 16 XU-
DAN navê: Bi mêwa xwe ya qenc
xweşik, darê zeytûnê yê hêşîn, li
te kir; bi galegala welwelê li ser
wê agir pê ve xist û guliyên wê
şikestin. 17 Ji ber xerabiya ku
mala Îsraêlê û mala Cihûdayê,
bona ku min hêrs bikin, ji Baal re
buxur vêxistinê bi xwe re kirine,
XUDANê artêşan ên ku te çikan-
diye, li dijî te emrê xerabiyê da.

*Dek û dolabên li dijî Yêremya hatine danîn*

Yêr 18,18-23; 2,1-12

18 Û XUDAN ji min re gîhand
û ez jî fêr bûm; wê gavê te karên
wan nîşanî min da. 19 Û ez mîna
berxika dermale[3] ya ku dibin
serjê kirinê bûm û nizanîbûm ku
bi gotina: Em darê tevî mêwa wê
helaq bikin û wê ji warê zindiyan
ve jêbikin û bavêjin ku bila êdî
navê wê neyê bîranînê! li dijî min
duzenê çêdikin! 20 Lê belê tu, ya
XUDANê artêşan yê ku bi dadiyê
serweriyê dike, dil û gurçikan
diceribîne, ez ê tola ku tuyê ji wan
hilde bibînim; ji ber ku doza xwe
ji te re vekirim! 21 Ji ber vê yekê
bona mêrên Anatotê XUDAN
wusa dibêje: Ew ên ku bi gotina: Bi
navê XUDAN ve peyxambertiyê

1 Ava kirin!
2 Goştê qurbanê.
3 Ya kedî kirî, malî, an jî: Ya malê.

neke ku, tu bi destê me nemire! li
canê te digerin. 22 Ji ber vê yekê
XUDANê artêşan wusa dibêje: A
vay, ez ê sehêtiyê li wan bikim;
dê egîd bi şûr ve bimirin; dê law
û qîzên wan bi xelayê ve bimirin
23 û dê ji wan re mawe nemîne;
ji ber ku ez ê xerabiyê ji mêrên
Anatotê re bînim, ez ê sala wan ya
ku li wan sehêtî bête kirin bînim!

*Yêremya gazincan dike*

12 Ez kengê bi te re têkevim
keftûleftê, tu bi heq e, ya
XUDAN; lê dîsa jî ez ê di der-
heqê daraziyan de bi te re biaxi-
fim; ma çima rêya xeraban bi oxir
û xayîn giş bêxem in? 2 Te wan
çikand û reh berdan, mezin dibin
û mêwê jî didin; di devên wan de
tu nêzîk î; lê belê tu ji dilên wan
ve dûr î! 3 Û tu, ya XUDAN, tu bi
min dizanî, min dibînî û ka dilê li
dijî te çawa yî tu diceribinî; wan
mîna mîhên qesaban cihê bike
û bona roja kuştinê wan amade
bike! 4 Ka dê heta çi wextî welat
şînê bikişîne û gîhayê beyarê hişk
bibin? Ji ber xerabiya yên ku lê
rûdinin heywan û civîk tune bûn;
ji ber ku wan: Dê dawiya me ne-
bîne! gotin.
5 Ger tu bi yên ku peya diçin ve
baz dabe û te westandibin, ka tuyê
çawa bi hespan re pêşbaziyê bike?
Û tu ku, li warê xweşiyê ve ewle
yî, ka tuyê di ser xwe çûna Urdunê
de çi bike? 6 Ji ber ku birayên te
û mala bavê te jî, wan jî xayîntiyê
ji te re kirin; wan jî li pêy te bang
kirin; ger gotinên qenc ji te re bi-
bên jî, ji wan bawer neke!
7 Min dev ji mala xwe berda,
mêrasa xwe ji ser xwe ve avêtim;
delala canê xwe dam destên ne-
yarên wî. 8 Mêrasa min ji min re
bû mîna şêrê daristanê; bi ser min
ve gurmîniyê kir; ji ber vê yekê
jê kerihîm. 9 Mêrasa min gelo
ji min re bûyî civîka deqdeqî û
hov? Bi dor û ber civîkên hov
gelo li dijî wê ne? Herin, hemû
cenawirên beyarê bicivînin, bona
ku bixwin û biqedînin bînin!
10 Pirr şivanan rezê min xera
kirin, para min cûtin, para minî
xweşik kirin çola tenha. 11 Wê
wêran kirin; wekî wêranxane-
yek be, li hemberî min şînê digirê,
hemûyê welêt bû wêran, ji ber ku
tu kes wê naxin dilên xwe. 12 Li
çolê talankir hatin ser hemû girên
tazî; ji ber, ji seriyekî warê heta
seriyekî dinî warê şûrê XUDAN
dixwe û diqedîne; ji hemûya mi-
rov re xweşî nîne! 13 Genim çan-
din û yên ku danîn çandin; kedê
dan û fêdê nedîtin û ji ber hêrsa
sor ya XUDAN ji zadê xwe ve
şerm bikin!
14 XUDAN li dijî cîranên xerab
ên ku dest li mêrasa ku bi mêrasî
dayîme netewa xwe Îsraêlê didin,
wusa dibêje: A vay, ez ê wan ji ser

erdê wan ve rakim û ez ê ji nav
wan mala Cihûda rakim. 15 Û dê
wusa bibe, paşî ku wan rakim,
ez ê bizivirim û dê heyfa min li
wan bê û ez ê her kesî vegerînim
mêrasa wan û her kesî vegerînim
welatê wan. 16 Û dê wusa bibe,
çawa ku bi Baal re sond xwarinê
hînî netewa min kirin, ger ew jî
hînî rêya netewa min û bi gotina;
bona heqê hebûna XUDAN! bi
navê min ve sond xwarinê hîn
bibin, wê gavê dê di nav netewa
min de bi bingeh bibin. 17 Lê
belê ger guhdarî nekin, wê gavê
ez ê wê netewê rakim, ez ê ji rehê
ve rakim û tune bikim, XUDAN
dibêje.

*Nîşana Piştika Kitanî*

13 XUDAN ji min re wusa got:
Here û ji xwe re piştikek
kitan bikire, bikire û li pişta xwe
bigerîne û wê nexe avê! 2 Û li gor
gotina XUDAN piştikê stendim û
wê li pişta xwe ve gerandim. 3 Û
cara duwemîn vê gotina XUDAN
ji min re hat: 4 Piştika li pişta xwe,
ya ku te stendibû rahêle û rabe,
here çemê Feratê û li wir di kovi-
ka zinarê de wê veşêre. 5 Û çûm û
mîna ku XUDAN emir dabû min
li cem Feratê wê veşartim. 6 Û
paşî pirr rojan wusa bû ku, XU-
DAN ji min re got: Rabe û piştika
ku ji te re gotibûm here Feratê û
li wir veşêre, ji wir rahêle! 7 Û
çûm Feratê û kolandim û ji cîhê
ku veşartibûm piştikê rahiştim û
a vay, piştik riziyabû û ji tu tiştî
re nedibû.
8 Wê gavê vê gotina XUDAN
ji min re hat: 9 XUDAN wusa
dibêje: Ez ê kubra Cihûdayê û
kubra mezin ya Orşelîmê wusa
birizînim! 10 Ev netewa xerab
ya ku naxwazin gotinên min guh-
darî bikin, di inyada dilê xwe de
dimeşin û bona ku ji îlahên wekî
din re qûlitiyê bikin û bona ku pe-
ristinê bikin li pêy wan meşiyan
e, dê bibin mîna vê piştika ku ji
tu tiştî re nabe! 11 Ji ber ku ger
şûtik çawa bi pişta mirovan re
bizeliqe, hemûya mala Îsraêlê û
mala Cihûdayê bi vî awayî bi xwe
ve zeliqandim, XUDAN dibêje;
zeliqandim ku bila ji min re bibin
netewe û nav û deng û hemd û
xweşikî; lê belê wan guhdarî ne-
kirin.

*Hebanê Xemrê*

Yêr 25.15-18.27

12 Ji ber vê yekê tuyê vê gotinê
ji wan re bibêje: Xwedayê Îsraêlê
XUDAN wusa dibêje: Dê her he-
ban bi xemrê ve tijî bibe! Û ger ew
ji te re bibêjin: Ma em qey baş ni-
zanin ku dê her heban bi xemrê ve
tijî bibe? 13 Wê gavê tuyê ji wan
re bibêje: XUDAN wusa dibêje:
A vay, ez ê hemûyên ku li vî warî
rûdinin, qiralên ku li ser texta Da-

wid rûdinin û kahînan û peyxam-
beran û hemûyên ku li Orşelîmê
ve rûdinin, bi serxweşiyê ve dagi-
rim. 14 Û bav û lawan, wekî ku bi
pev re bin ez ê wan li hev bixim,
XUDAN dibêje, dê heyfa min li
wan neyê û ez ê neparêzim, ez ê
di helaq kirina wan de dilovaniyê
nekim!

*Sirgûn nêzîk dibe*
2.Qir 24,8-16

15 Guhdarî bikin û guh bidin; ne
bi kubir bin; ji ber ku XUDAN
got. 16 Berî ku tarîbûn dakeve û
berî ku lingên we li ser çiyayên
tarî neçerixin û dema hûn li benda
ronahiyê bin, berî ku wê venezi-
virîne siya mirinê û reşe tariyê
bîne, mezintiyê bidin Xwedayê
xwe XUDAN! 17 Lê belê ger
hûn wî guhdarî nekin, ji ber kubra
we dê canê min bi dizîka bigirî û
çavê min bi jan û êş ve bigirî û dê
hêstiran birijîne; ji ber ku keriyê
XUDAN sirgûn kirin.
18 Ji qiral re û ji dayika qiral re
bibêje: Xwe nizm bikin û li erdê
rûnin; ji ber ku xemla serê we,
taca we ya xweşik ket! 19 Bajarên
başûr[1] hatin girtin û kesî ku veke
nîne; hemûya Cihûdayê hatin ajo-
tin, gişt pev re hatin ajotin.
20 Çavên xwe rakin û yên ku ji
bakur ve tên bibînin: keriyê ku
ji te re hatiye dayîn, keriyê te yî
xweşik ka li ku derê ye? 21 Dema
zilamê ku te hevalbûna xwe hînî
wan kiriye, bi serîtî deyne ser te
tuyê çi bibêje? Mîna janên pîreka
ku diwelidîne, gelo dê jan bi te ve
jî negire? 22 Û ger di dilê xwe de
tu: Ma çima vana hatin serê min?
bibêje, ji zêdeyiya fesadiyên te
dawa te vebû û bi dijwarî pahni-
yên te tazî bûn.
23 Gelo Ḧebeş dikare çermê xwe
an jî piling deqên xwe biguhere?
Wê gavê hûn, ên ku hînî xerabî
kirinê bûne, hûn jî dikarin qenciyê
bikin! 24 Ji ber vê yekê ez ê wan
mîna hûrikê kayê bi bayê çolê ve
dikeve belav bikim. 25 Pişka ku
ji te re ketiye, para ku ji te re pîva
me ew e, XUDAN dibêje; ji ber
ku te min ji bîra kir û tu bi derewê
ve ewle bû. 26 Ji ber vê yekê ez ê
jî dawên te hilkişînim ser wecê te
û dê şermiya te xuyanî bibe. 27 Li
ser girên ku li beyarê ne, tiştên te
yên mekrûh, zînayên te û hêrînên
te, bêariya fahşetiya te dîtim. Wey
li serê te ya Orşelîm! Tuyê neyê
paqij kirin: ka heta çi wextî?

*Şûr û Ziwayî*

14 Gotina XUDAN ya ku di
derheqê ziwabûnê de ji
Yêremya re hatiye.
2 Cihûda şînê dikişîne û deriyên
wê rengavêtî, reşan li xwe kirine,
li erdê rûdinin û qêrîna Orşelîmê

[1] Bi Îbranîtî Negeb, aliyê başûrê Cihûdayê ye.

bilind bû. 3 Û pêşhatiyên wê
biçûkên xwe dişînin avan; tên sa-
rincan û avê nabînin; feraxên wan
vala vedigerin; şerm dikin û rus-
way dibin û serê xwe duxumînin.
4 Ji ber ku li welêt baran nîne, ji
ber erdên qelişîne cotkar şermezar
dibin, serê xwe duxumînin. 5
Belê, aska li çolê jî çêlika xwe di-
zîne û berdide, ji ber ku gîha nîne.
6 Û kerên kûvî li ser girên tazî
disekinin, mîna çeqelan hewayê
bêhn dikin; çavên wan ditefin ji
ber ku hêşînahî nîne.
7 Bi rastî ger fesadiyên me li dijî
me şahdeyiyê bikin jî, tu ji ber
navê xwe, ya XUDAN buşuxule,
ji ber ku çivanokiyên me zehf in;
me li dijî te sûcê kirin. 8 Ya tu,
hêviya Îsraêlê, di dema tengasiyê
de Xelaskerê wê, ma çima tu li
welêt dibe mîna xerîbekî û mîna
rêwiyek bona şevbuhêrkê bike
ji rêya xwe ve çewt dibe? 9 Ma
çima tu dibe mîna zilamekî şaş
bûye û egîdekî hêza wî nîne ku
xelas bike? Lê belê tu di nav me
de ye, ya XUDAN û em bi navê te
ve tên bang kirin; me bernede!
10 XUDAN ji vê netewê re wusa
dibêje: Bi vî awayî ji gerînê hez
kirin; lingên xwe negirtin; ji ber
vê yekê XUDAN ji wan ve ne
razî ye; dê niha fesadiya wan di
bîra xwe de bîne û sehêtiya sûcên
wan bike! 11 Û XUDAN ji min re
got: Bona ku ji vê netewê re qencî
bibe, lava neke! 12 Dema rojiyê
bigirin ez ê feryadên wan nebihî-
zim û dema pêşkêşiya şewitandinê
û pêşkêşiya nan pêşkêş bikin, ez ê
ji wan razî nebim; lê belê ez ê bi
şûr û bi xelayê û bi webayê wan
biqedînim!
13 Û gotim: Ax ya Xudan, XU-
DAN! A vay, peyxamberan ji wan
re: Hûn ê şûr nebînin û dê di we
de xela tune be; lê belê li vî cîhî
bi rastî jî ez ê selametê bidim we
dibêjin! 14 Û XUDAN ji min re
got: Peyxamberan bi navê min
ve peyxamberiya derewîn dikin;
wan neşandim û emir li wan ne-
kirim; peyxambertiya ku li we
dikin, xewn û xeyalekî derewîn
û falavêjî û tiştên vala û fenekiya
dilên wan in! 15 Ji ber vê yekê
XUDAN wusa dibêje: Dema
em werin peyxamberên ku wan
neşandime û ên ku bi gotina: Dê
li vî warî şûr û xela tune be bi
navê min ve peyxambertiyê di-
kin, dê ev peyxamberan bi şûr û
xelayê ve biqedin! 16 Û netewa
ku ji wan re peyxambertiyê kirine
jî dê ji ber xela û şûrê bên avêtinî
kuçeyên Orşelîmê û yê ku wan,
pîrekên wan û lawên wan û qîzên
wan binax bike tune be; ji ber ku
ez ê xerabiyên wan bi ser wan ve
birijînim! 17 Û tuyê vê gotinê ji
wan re bibêje: Bila çavên min bi
şev û rojê hêstiran birijînin û ne-
sekinin; ji ber qîza netewa min ya

ku neçûye mêr, bi lêxistinekî zehf
xemdar, bi şikestina mezin ve
şikest. 18 Ger ez derkevim beya-
rê, a vay, yên ku şûr wan kuştine!
Û ger ez bikevim bajêr, a vay,
nexweşiyên xelayê! Ji ber ku pey-
xamber jî, kahîn jî, di gera welêt
de ne û bi tiştekî ve nizanin.
19 Ma te Cihûdayê bitûmî bitûmî
ji xwe avêtiye? Canê te ji Siyonê
ve kerihî? Ma çima te li me xist
û ji me re şîfa nîne? Em li hêvi-
ya selametê man û qencî nehat
û em li hêviya dema şîfayê man
û a vay, bêzarî! 20 Ya XUDAN
em bi xerabiya xwe û bi fesadiya
bapîrên xwe ve dizanin; ji ber ku
me li dijî te sûcê kirin. 21 Di oxra
navê xwe de me biçûk nebîne;
texta mezintiya xwe erzan neke;
peymana xwe ya ku bi me re ye,
di bîra xwe de bîne û xera neke!
22 Ma di nav pûtên neteweyan
de yê ku dikare baranê bibarîne
heye? Û gelo ezman dikarin ba-
ranê bidin? Ya XUDAN Xwe-
dayê me, ma ew ne tu yî? Û em ê
li benda te bisekinin, ji ber ku te
hemûyên van tiştan çêkir!

*Têkçûn tê*
Hêz 14,12-21

15 Û XUDAN ji min re got:
Ger Mûsa û Samûyêl li
hember min bisekinin jî, dîsa
canê min berê xwe nade vê ne-
teweyê. Wan ji ber min bavêjin
ku bila derkevin! 2 Û dê wusa
bibe ku, dema ji te re bibêjin: Em
derkevin ku derê? Tuyê ji wan re
bibêje: XUDAN wusa dibêje: Yê
ku bona mirinê be, dê ji mirinê re
û yê ku bona şûr be, dê ji şûrê re û
yê ku bona xelayê be, dê ji xelayê
re û yê ku bona sirgûnê be, dê ji
sirgûnê re! 3 Û ez ê çar celebî
deynim ser wan, XUDAN dibêje;
bona kuştinê şûr, bona perçe ki-
rinê kûçikan û bona xwarin û
qedandin û helaq kirinê civîkên
ezmanan û cenawirên erdê! 4 Û
ji ber Manaşşeyê lawê Hîzkiyayê
qiralê Cihûdayê, ji ber tiştên ku li
Orşelîmê kirine, bona ku di nav
hemû welatên dinê de bi vî alî û
wî alî ve bên avêtin ez ê wan bi-
dim dest.
5 Ji ber ku ya Orşelîm, ma dê dilê
kî li te bişewite? Û dê heyfa kî li te
were? Û ma dê kî bona ku rewşa te
bipirse, ji rêya xwe ve çewt bibe?
6 Te min ji xwe ve avêt, XUDAN
dibêje, tu paş ve çû; min jî destê
xwe bi ser te ve dirêj kir û te he-
laq kir. Ez ji ber poşmanbûnê êdî
westiyam. 7 Û di deriyê welêt de
wan bi melhêvê ber ba kirim; wan
bê zarok hiştim, netewa xwe tune
kirim; ji rêyên xwe venegeriyan.
8 Jinên wan ên bî, ji qûmên behrê
zêdetir li hemberî min zêde bûn;
bi nîvrojê talanker bi ser wan ve,
bi ser dayika egîdan ve anîm; ten-
gasî û toqînan nişka ve bi ser wê

ve xistim. 9 Pîreka ku heft zarok
aniye dinê lawaz ket û can da; hîn
nava rojê bû roja wê çû ava; şerm
kir û wec lê sor bû û ez ê yên ku
ji ber wan mayîne li ber neyarên
wan bidim şûr, XUDAN dibêje.

*Yêremya keserên xwe ji XUDAN re dibêje*

L.Yêr 3,59-66

10 Ya dayika min, te min bona
ku ez bi hemûya dinê re bibim zilamê şer û zilamê keftûleftê, aniye dinê, wax li serê min! Min bi
selefê pere neda û bi selefê pere
nedan min; lê belê her kes naletê
li min dikin!
11 XUDAN got: Bi rastî, ez ê
te bona rastiyê xwurt bikim! Bi
rastî, ez ê wexta asîwê û di wexta
tengasiyê de neyar li ber te bidim
lava kirin! 12 Ma zilam dikare hesin, hesinê bakur û tûncê bişkîne?
13 Ez ê malên te û xezîneyên te,
wekî talana bêberdêl bidim, vêya
jî ji ber hemû sûcên te û di hemû
sînorên te de bikim. 14 Û ez ê wan
bi neyarên te re bişînim warên ku
tu bi wan nizanî; ji ber ku di hêrsa
min de agirek dê li ser we vêkeve
pêket!
15 Tu dizanî, ya XUDAN! Min
di bîra xwe de bîne û li min bigere û tola min ji yên ku bera min
didin ve hilde; hêrsa xwe di derengiyê de nehêle û min bi dest ve
bernede; bizanibe ku di oxra te de
ruswaytiyê kişandim! 16 Gotinên
te hatin dîtin û wan xwarim û gotinên te ji min re bûn kêfxweşî û
ji dilê min re bûn şabûn; ji ber ku
ez bi navê te ve tême bang kirin,
ya Xwedayê artêşan XUDAN!
17 Ez di komelên yên ku dikenin
de rûneniştim û kêfxweş nebûm
û necoşiyam; ji ber destê te ez
tena serê xwe rûniştim; ji ber ku
te min bi xezebê ve dagirt. 18 Ma
çima êşa min bidomî û birîna min
bêçare, naxwaze ku qenc bibe?
Bi rastî, tuyê ji min re bibe mîna
çemê xapînokî, an jî avên ku ne
ewle ne?
19 Ji ber vê yekê XUDAN wusa
dibêje: Ger tu vegere, ez ê te şunda
bînim û tuyê li ber min bisekine û
ger tuyê yê birêz ji yê bêrêz cuda
bike, tuyê bibe mîna devê min;
ew ê vegerin te, lê belê nabe ku
tu vegere wan! 20 Û ez ê te ji vê
netewê re bikim dîwarekî tûnc
ya hatiye zeximandin û dê li dijî
te cengê bikin, lê belê dê quweta
wan negihêje te; ji ber ku bona xelas kirina te û bona azad kirina te
ez ê bi te re bim, XUDAN dibêje.
21 Û ez ê te ji destê xeraban azad
bikim û ez ê te ji lepên zilamên
tirsehêz bi fidyê xelas bikim!

*Roja Têkçûnê*

16 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Ji xwe re jin
nestîne û bila li vê derê lawên te û

qîzên te çênebin! 3 Ji ber ku bona
law û qîzên li vir bên dinê û bona
dayikên ku wan bînin dinê û bona
bavên wan ên ku li vî welatî bûne
sedema bûyîna wan, XUDAN
wusa dibêje: 4 Dê bi mirinên
jandar ve bimirin; kesî ku bona
wan li xwe bixe, dê tune be û dê
neyên binax kirin; dê li rûyê erdê
bibin mîna zibilê[1] û dê bi şûr û xe-
layê ve biqedin û dê laşên wan jî
ji cenawirên erdê û civîkên ezma-
nan re bibe êm!
5 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Nekeve mala şînê û bona li xwe
xistinê neçe û bona wan fixanê
neke; ji ber ku xweşiya xwe, xêr
û dilovaniyan ji vê netewê ve
rakirim, XUDAN dibêje. 6 Û
dê li vî welatî mezin jî, biçûk jî
bimirin; dê neyên binax kirin û
dê mirov bona wan li xwe nexin
û xwe birîndar nekin û dê bona
wan porên xwe nerûçikînin 7 û
dema ji ber mirî bona xemrevîni-
yê şînê bikişînin, dê nan neşkînin
û dê bona dayik û bavên wan
tasa xemrevîniyê bi wan ve ne-
din vexwarin. 8 Û bona xwarin
û vexwarinê bi wan re rûnê, tuyê
nekeve mala ziyafetê. 9 Ji ber
ku Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: A vay, ez ê
di rojên we de û li ber çavên we,
ji vê derê dawiya dengê şabûnê û
dengê kêfxweşiyê û dengê zava û
dengê bûkê bînim!
10 Û dê wusa bibe ku, dema tu
hemûyên van gotinan bighîne vê
netewê, dema ew jî ji te re: Ma
çima XUDAN li dijî me vê xera-
biya mezin got? Û fesadiya me çî
ye? Û sûcê ku me li dijî Xwedayê
xwe XUDAN kirine çî ye? bibêjin.
11 Tuyê ji wan re bibêje: Madem
ku bapîrên we dev ji min berdan,
XUDAN dibêje û li pêy îlahên
wekî din meşiyan û ji wan re qûli-
tiyê kirin û ji wan re peristinê kirin
û dev ji min berdan û bi zagona
min ve negirtin! 12 Û we ji bapîrên
xwe zêdetir xerabiyê kirin; a vay,
hûn ji bona min guhdarî nekin, her
yekê we li pêy inyada dilê xwe ve
dimeşin; 13 ji ber vê yekê ez ê we
ji vî welatî bavêjim welatekî ku
bapîrên we jî, hûn jî pê nizanin û
hûn ê li wir şev û roj ji îlahên wekî
din re qûlitiyê bikin; ji ber ku ez ê
ji we re sayê nekim!
14 Ji ber vê yekê, XUDAN dibêje,
a vay, êdî rojên ku dê nebêjin:
Bona mafê hebûna XUDANê ku
lawên Îsraêl ji warê Misirê ve
derxistiye! 15 Lê: Bona mafê he-
bûna XUDANê ku lawên Îsraêl ji
warê bakur, ji hemû welatên ku
wan ajotiye derxistiye! bibêjin
tên. Û ez ê wan dîsa bînim axên
ku dabûm bapîrên wan.
16 A vay, ez ê pirr masîvanan bî-
nim, XUDAN dibêje û dê wan

[1] Sergîn.

bigirin û ez ê paşî wê pirr nêçîr-
vanan bînim û dê ji ser her çiyayî
û ji ser her gir û ji quntara zinaran
nêçîra wan bikin. 17 Ji ber ku ça-
vên min li ser hemû rêyên wan;
ji wecê min ve ne veşartiye û fe-
sadiya wan ji çavên min re nehat
veşartin. 18 Û pêşiyê ez ê fesadi-
yên wan û sûcên wan bi du qatî
bidim, ji ber ku bi laşên tiştên xwe
yî sik ve welatê min gemarî kirin
û bi tiştên xwe yî mekrûh mêrasa
min dagirtin.
19 Ya XUDAN, quweta min û
birca min û di roja tengasiyê de si-
targeha min! Dê netewe ji serîkên
dinê ve werin cem te û bibêjin:
Bapîrên me tenê derewan mêras
stendin, pûtên bêqîmet yên ku qet
nikarin alîkariyê bikin! 20 Ma mi-
rov ji xwe re îlahan çêdikin? Û ew
ne îlah in!
21 Bo vê yekê, ez ê bi wan bidim
nas kirin, a vay, ez ê vî carî destê
xwe û qudreta xwe yî di ser her
tiştî de ye ji wan re bidim nasîn
û dê bizanibin ku, navê min XU-
DAN e!

*Sûcê Cihûda*

17 Sûcê Cihûda bi pênûska
hesin, bi serîkê almast ve
hate nivîsandin; 2 dema lawên
wan pêşkêşî û Aşerên wan ên ku
li ser girên bilind, li cem darên
hêşîn in di bîra xwe de dianîn,
li lewha dilên wan û li qiloçên
pêşkêşîgehên we ve hatin qewar-
tin. 3 Ya çiyayê min ê ku li be-
yarê ye, di hemû sînorên te de,
ez ê malê te, hemû xezîneyên te û
cîhên te yên bilind ji ber sûcê bi-
dim talanê. 4 Û tuyê bi xwe dev ji
mêrasa xwe ya ku dabûm te berde
û ez ê li warê ku tu pê nizane ji
neyarên te re qûlitiyê bi te bidim
kirin; ji ber ku we agirê di hêrsa
min de abadîn vêkeve pêxistin.
5 XUDAN wusa dibêje: Zilamê
ku bi mirov re ewle dibe û mirov ji
xwe re dike bazû û dilê wî ji XU-
DAN ve biqete bi nalet e! 6 Ji ber
ku dê bibe mîna dargeza li çolê
yî û dema qencî were dê nebîne,
lê li cîhên ziwa ên ku li çolê ne,
li warê xwê ên ku tu kes rûnanê
dê rûnê. 7 Xwezî li wî zilamê ku,
bi XUDAN re ewle dibe û yê ku
ew pê bawer e. XUDAN e! 8 Ji
ber ku dê bibe mîna darê ku li ber
avê hatiye çikandin, ew darê ku, ji
qeraxa şet ve rehên xwe berdide
û dema germî bê, natirse û pelê
wê hêşîn dibe û di sala ziwatiyê
de xemê nakişîne û ji mêw dayînê
şunda namîne.
9 Dil ji her tiştî zêdetir xapînokî ye
û qels e; ma kî dikare wî fêhm bike?
10 Ez, XUDAN, bona ku ji her kesî
re, li gor dilên wan, li gor hilbera
karên wan bidim dil tev didim,
dil diceribînim. 11 Kewê ku li ser
hêkên wê nekiriye rûniştiye çawa
be, kesê ku bi neheqiyê ve hebûnê

qezenc kiriye jî wusa ye; di nêviyê
rojên wî de dev ji wî berdide, ew jî
di dawiyê de bêhiş dibe!
12 Cîhê Perestgeha me, texta me-
zintiyê ya ku ji destpêkê ve hatiye
bilind kirinê ye! 13 Ya XUDAN,
hêviya Îsraêlê! dê hemûyên ku te
berdane şerm bikin. Yên ku ji min
qetiyane dê li axê ve bên nivîsan-
din, ji ber ku dev ji XUDAN, ji
çavkaniya avên zindî berdan. 14
Ya XUDAN, şîfayê bide min û ez
ê şîfa bibînim; min xelas bike û ez
ê xelas bibim; ji ber ku yê ez bi wî
pesnahiya xwe didim tu yî.
15 A vay, ew ji min re: Kanê go-
tina XUDAN li ku ye? De bila
were! dibêjin. 16 Lê ez jî li pêy
te ji şivanbûnê nerewiyam û min
roja asîwê nexwest; tu dizanî; ya
ku ji lêvên min ve derdikeve li
ber çavê te bû. 17 Ji min re nebe
toqîn; di roja asîwê de sitargeha
min tu yî! 18 Yên ku bera min
didin bila şerm bikin, lê belê ez
şermezar nebim; bila ew bikevin
bêzariyê, lê belê ez nekevim; roja
asîwê bîne ser wan ku, bi du qat
şikestinê wan bişkîne!

*Îkazên ji bo Pîrozkirina Sebtê*
2.Mûs 20,8-11; Neh 13,15-21

19 XUDAN ji min re wusa got:
Here û li hemû deriyên Orşelîmê û
li deriyê lawên netewa min ya ku
qiralên Cihûda dikevin û derdike-
vin bisekine 20 û ji wan re bibêje:
Ya qiralên Cihûdayê û hemûya
Cihûdayê û giştikên li Orşelîmê
rûdinin, yên ku ji van deriyan der-
bas dibin, gotina XUDAN guhdarî
bikin! 21 XUDAN wusa dibêje:
Canê xwe biparêzin û roja Sebtê
bar nekişînin û ji deriyê Orşelîmê
ve neynin hundir! 22 Û roja Seb-
tê ji malên xwe ve bar dernexînin
û qet tu karî nekin û roja Sebtê,
mîna ku ji bapîrên we re emir ki-
rime pîroz bikin! 23 Lê belê guh-
darî nekirin û guh nedanê û bona
ku nebihîzin û jê fêr nebin[1] histuyê
xwe hişk kirin.
24 Û dê wusa bibe ku, ger hûn
bona ku roja Sebtê ji deriyên vî
bajarî bar neynin û lê belê bona
ku bi tu kar nekirinê wê pîroz
bikin, bi qencî min guhdarî bikin,
XUDAN dibêje; 25 wê gavê dê
qiralan û serokan, yên ku li ser
texta Dawid rûdinin, yên ku li
erebeyan û li hespan siwar dibin,
ew bi xwe û serokên wan, mêrên
Cihûdayê û yên ku li Orşelîmê
rûdinin, dê ji deriyê vî bajarî
ve derbas bibin û dê ev bajar
abadîn li cîhê xwe bimîne. 26 Û
dê ji bajarên Cihûdayê û ji dora
Orşelîmê û ji warê Benyamînê û
ji Şefelayê[2] û ji çiyayiyê û ji başûr
pêşkêşiyên şewitandinê û qurba-

[1] Dersê negirin.

[2] Cîhê çiyayî ya ku li rojhilata deşta Sahilê ye.

nan û pêşkêşiyên nan û gunnukê
bînin û dê pêşkêşiyên şikiryê
bînin û werin mala XUDAN.
27 Û ger hûn bi roja Sebtê di de-
riyê Orşelîmê de derbas nebûnê
û bi bar nekişandinê pîroz kirina
roja Sebtê de min guhdarî nekin;
wê gavê ez ê di deriyên wê de agir
pêbixim û dê qesrên Orşelîmê
bixwin û biqedînin û dê netefe!

*Karxana Pîrot*

18 Ev gotin ji XUDAN ve hate
Yêremya:
2 Rabe û dakeve mala pîrot[1] û li
wir ez ê gotinên xwe bi te re bi-
dim bihîstin! 3 Û ez daketim mala
pîrot û a vay, li ser çerxê kar bi-
kar dianî. 4 Û dema feraxê ku ji
heriyê çêdikir di destê pîrot de
xera bû, wekî ji pîrot re xweş hate
xuyanî kirin dîsa ji wê feraxekî
din çêkir.
5 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 6 Ya mala Îsraêl, ma qey ez ni-
karim mîna vî pîrotî li we bikim?
XUDAN dibêje. A vay, herî di des-
tê pîrot de çawa be, hûn jî di destê
min de wusa ne, ya mala Îsraêl!
7 Neteweyekê û an jî welatekî ji
rehê ve rakirin û bona xera û tune
kirinê, di dema ku ez ji ber wê bi-
bêjim de, 8 ger netewa ku min di
derheqê wan de gotiye, ji xerabiya
xwe vegere, ez ê ji asîwa ku bona
li wê bikim difikirîm poşman di-
bim. 9 Û di dema gotina ku bona
neteweyekî an jî welatekî ava
bikim û wê biçikînim de ji ber wê
bibêjim, 10 ger bona ku gotina min
guhdarî neke, ya ku di çavê min de
xerab e bike, ez ji qenciya ku bona
qenciyê pê bikim gotim e poşman
dibim. 11 Û niha, bi mêrên Cihû-
dayê re û bi yên ku li Orşelîmê rû-
dinin re biaxife û ji wan re bibêje:
XUDAN wusa dibêje: A vay, ez li
dijî we, pêşniyara asîwê dikim û
li dijî we duzenekî difikirim; niha
her yekê we, ji rêya xwe yî xerab
vegerin û rêyên xwe û karên xwe
baş bikin! 12 Lê belê ew dibêjin:
Tiştekî vala; ji ber ku em ê li pêy
duzenên xwe ve bimeşin û dê her
yekê me li gor inyada dilê xwe yî
xerab bikin!
13 Ji ber vê yekê XUDAN wusa
dibêje: Niha di nava neteweyan de
bipirsin, ka kî tiştên ûsa bihîstine;
qîza Îsraêl ya ku neçûye mêr ka-
rekî zehf tirsehêz kir! 14 Ma ji zi-
nara zeviyê berfa Lubnanê tu carî
kêm dibe? Avên sar ên ku ji dûr ve
diherikin tu carî ziwa dibin? 15 Ji
ber ku netewa min, min ji bîr kirin,
ji îlahên derewîn re buxurê vêxistin
û bona ku di rêyên qeraxê ên ku ax
lê nehatine rijandin de bimeşin, di
rêya wan de, di rêyên kevin de wan
çerixandin ku, 16 bila welatê wan
bikin tiştekî ku şaş dike û abadîn
fikandin lê bê kirin; dê her kesê ku

1 Kûzker, kûzikvan.

ji wir derbas bibe şaş bibe û dê serê
xwe kil bike. 17 Ez ê mîna bayê
rojhilatê wan li ber neyar belav
bikim û di roja wanî bêtariyê de ez
ê ne wec, lê paş rê wan bidim!
18 Wê gavê gotin: Werin ku em
li dijî Yêremya duzenan bifikirin;
ji ber ku di kahîn de zagon û di
zilamê bi zanyar de şîret û di pey-
xamber de gotin tune nabe. Werin
ku em bi ziman lê bixin û qet tu
gotina wî guhdarî nekin!
19 Ya XUDAN, qenc min guhdarî
bike û gotina yên ku bi min re di-
kevin keftûleftê bibihîze! 20 Ma li
berdêla qenciyê xerabî tête dayîn?
Ji ber ku ji canê min re kortalê
kolan. Bona hêrsa te ji wan ver-
gerînim, ji bo qenciyê bona wan
bibêjim ka çawa li ber te sekinî-
me di bîra xwe de bîne! 21 Ji ber
vê yekê lawên wan bide xelayê
û wan bide destê şûr û bila jinên
wan bê zarok û bî bimînin û bila
mirin mêrên wan bibe; di cengê
de bila şûr li egîdên wan bixe!
22 Dema tu nişka ve leşker bi ser
wan ve bîne, bila ji malên wan ve
qêrîn bête bihîstin; ji ber bona ku
bi min bigirin kortalê kolan û bona
lingên min dafikan veşartin! 23 Lê
belê ya XUDAN, tu bi hemû şîretên
wanî bona kuştinê li dijî min in di-
zanî; li fesadiyên wan neborîne û
sûcên wan ji ber xwe paqij neke; lê
belê bila li ber te têk biçin; di dema
hêrsa xwe de li dijî wan bixebite!

*Kûzê ku dişkê*

19 XUDAN wusa got: Here û
kûzekî axînî ya karê pîrot
bistîne û ji kalepîrên netewê û ji
kalepîrên kahînan çend hebî bigi-
re cem xwe 2 û hilkişe şetê lawê
Hînnom ya ku li cîhê ketina deri-
yê Harsîtê yî û gotinên ku ez ê ji
te re bibêjim li wir bang bike 3 û
bibêje: Gotina XUDAN guhdarî
bikin, ya qiralên Cihûdayê û yên
ku li Orşelîmê rûdinin! Xwedayê
Îsraêlê, XUDANê artêşan wusa
dibêje: A vay, ez asîwekê bînim
ser vir ku bila guhên her yên ku bi-
bihîzin biçîngin. 4 Madem ku min
berdan û vê derê mindar kirin û li
wir ji îlahên ku ew û bapîrên wan
û qiralên Cihûdayê pê nizanin re
buxurê vêxistin û vê derê bi xwîna
bêsûcan dagirtin 5 û wekî tiştekî
ku emrê wê nedame û negotime
û ji hişê min ve derbas nebûye,
bona ku ji Baal re bibe pêşkêşiya
şewitandinê zarokên xwe di agir
de bişewitînin, cîhên bilind ên
Baal ava kirin; 6 ji ber vê yekê, a
vay, XUDAN dibêje, roj têne ku
êdî dê ji vê derê re Tofet û newala
lawê Hînnom nebêjin, lê jê re dê
newala Serjêkirinê bête gotin! 7 Û
ez ê şîretên Cihûda û Orşelîmê li
vê derê vala derxînim û ez ê wan
li ber neyarên wan bi şûr û bi des-
tê yên ku li canên wan digerin ve
bixînim û ez ê laşên wan wekî
xwarinê bidim cenawirên erdê

û civîkên ezmanan. 8 Û ez ê vî
bajarî bikim tiştekî ku lê şaş tête
mayîn û lê fîkandin tête kirin, her
yê ku ji wir derbas bibe, dê şaş
bimîne û ji ber hemû asîwên wê
bifîke. 9 Û ez ê goştê lawên wan
û goştê qîzên wan bi wan ve bidim
xwarin û di tengasî û dorgirtina ku
neyarên wan û yên ku li canê wan
digerin wan xistinê de, dê her yekê
wan goştê cîranê xwe bixwin.
10 Wê gavê tuyê kûz li ber zilamên
ku bi te re diçin bişkîne 11 û tuyê
ji wan re bibêje: XUDANê artêşan
wusa dibêje: Çawa ku feraxa pîrot
dişkînin û ew jî carekî din nacebire,
ez ê jî bi vî awayî vî bajarî û vê ne-
tewê bişkînim û heta ku cîh nemî-
ne, dê li Tofetê binax bikin. 12 Ez
ê vî bajarî jî bikim mîna Tofetê û li
vî cîhî û li yên ku li vir rûdinin re
wusa bikim, XUDAN dibêje 13 û
dê malên Orşelîmê û malên qiralên
Cihûdayê yên ku mirdar bûne,
hemûyên wan xaniyên ku li ser
xaniyên wan ji hemûya artêşa ez-
manan re buxur hatine şewitandin
û ji îlahên wekî din re pêşkêşiyên
rijandinê hatine rijandin, dê bibin
mîna cîhê Tofetê!
14 Û Yêremyayê ku XUDAN wî
bona peyxambertiyê bike şandibû
Tofetê, ji wir vegeriya û di hewşa
mala XUDAN de sekinî û ji
hemûya netewê re got: 15 Xwe-
dayê Îsraêlê, XUDANê artêşan
wusa dibêje: A vay, ez ê hemûyên
asîwên ku li dijî vî bajarî gotime
bînim ser wê û hemû navçeyên
wê; ji ber bona ku gotinên me
guhdarî nekin, histuyên xwe hişk
kirin!

*Yêremya bi Paşhûrê Kahîn re dikeve keftûleftê*

20 Û Paşhûrê lawê kahîn Îm-
mer, serkarmendê mala
XUDAN; dema Yêremya bi van
gotinan peyxambertiyê dikir wî
bihîst. 2 Û Paşhûr li peyxamber
Yêremya xist û wî li feleqê li de-
riyê Benyamîn ya jora ku li mala
XUDAN e xist. 3 Û roja din wusa
bû ku, Paşhûr Yêremya ji feleqê
derxist. Û Yêremya jê re got: XU-
DAN ne navê Paşhûr, lê Magor-
Mîssabîb[1] li te kir! 4 Ji ber ku
XUDAN wusa dibêje: A vay, ez
ê te ji te re û ji hemû hezkirên te
re bikim toqîn û dê ew ê bi şûrê
neyarên te ve bikevin û dê çavên
te bibînin û ez ê hemûya Cihû-
dayê bidim destê qiralê Babîlê û
dê wan bajon Babîlê û dê bi şûr li
wan bixe. 5 Û ez ê hemû dewle-
mendiya vî bajarî û hemû qezenca
wê û hemû tiştên wê yî biqîmet û
hemû xezîneyên qiralên Cihû-
dayê bidim destê neyarên te û dê
wan talan bikin û rahêlin û bibin
Babîlê. 6 Û tu, Paşhûr û hemûyên
ku di mala te de rûdinin, hûn ê

1 Li hawirdorê toqîn.

herin sirgûnê; tu û hemû hevalên
te yên ku tu ji wan re peyxamber-
tiya derewîn dikî, hûn ê bigihêjin
Babîlê û li wir bimirin û hûn ê li
wir bên binax kirin!

*Gazincên Yêremya*

7 Ya XUDAN, te min xapand, ez
jî xapiyam, tu ji min xwurttir î û
te min bi bin ve xist[1]; ez di tûmiya
rojê de pêkenok bûm, her kes qer-
fên xwe bi min dikin! 8 Ji ber çawa
ku her carî dibêjim ez feryadê di-
kim; bi gotina: Zordestî û şelandin!
diqêrim; ji ber ku di tûmiya rojê
de gotina XUDAN ji min re bû
ruswaytî û qerfokî. 9 Û: Ez ê wî
di bîra xwe de neynim û êdî ez ê
bi navê wî ve nebêjim, gotim; wê
gavê di dilê min de bû mîna agi-
rekî vêketî, di nav hestiyên min de
ye û ez ji bi xwe girtinê westiyam,
êdî ji destê min ve nayê. 10 Ji ber
ku keftûleftî kirina pirran bihîstim,
bi dor û ber toqîn. Hemû hevalên
min ên nêzîk, yên ku li benda ke-
tina min in dibêjin: Gilî bikin, em
ê jî wî gilî bikin! dibe ku bixape û
em bi ser wî ve bikevin û ji wî tola
xwe hildin!
11 Lê belê XUDAN mîna egîdekî
tirsehêz bi min re ye; ji ber vê yekê
ên ku bera min didin, dê biçerixin
û dê bi ser ve nekevin; ji ber ku
bi baqilî nekirine, dê bi rezîltiyekî
abadîn ya tu carî nayê ji bîr kirin
zehf şermezar bibin! 12 Lê belê ya
tu, XUDANê artêşan ê ku salih di-
ceribîne, gurçik û dilê wî dibîne, ez
tola ku tuyê ji wan hilde bibînim!
Ji ber ku doza xwe ji te re veki-
rim. 13 Ji XUDAN re bistirên, ji
XUDAN re şikiryê bikin! Ji ber ku
canê xizan ji destê yê ku xerabiyê
dike ve xelas kir!
14 Roja ku ez ḫatime dinê, bila
bi nalet be; bila roja ku dayika
min, min aniye dinê pîroz nebe!
15 Zilamê ku bi gotina: Zarokek
te yî law çêbû, mizgîniyê ji bavê
min re biriye û wî kêfxweş kiri-
ye, bila bi nalet be! 16 Û bila ew
zilam bibe mîna bajarên ku XU-
DAN poşman nebûye û wan xera
kirine û bila sibehê qêrîn û nîvroj
bang kirin bête bihîstin; 17 ji ber
ku min di rehmê de nekuşt; dê
dayika min jî biba gora min û dê
rehma wê her tim ducanî bimaya!
18 Ma çima ez, bona ku zehmet û
keserê bibînim û rojên min bi rus-
waytiyê biqedin ji rehma dayikê
ve derketim?

*Xwesteka Tsedekiya tête red kirin*

21 Gotina ku dema qiral Tse-
dekiya Paşhûrê lawê Mal-
kiya û kahîn Tsefanyayê lawê
Maaseya şandin cem Yêremya
û: 2 Ez rica dikim, bona me ji
XUDAN bipirse; ji ber ku qiralê
Babîlê Nebûkadnetsar li dijî me

[1] Mexlûb kir.

cengê dike; dibe ku XUDAN bi
me re li gor hemû karên şaş dikin
bike ku ew ji ser me rabe gotiye;
ji aliyê XUDAN ve ji Yêremya re
hatiye.
3 Wê gavê Yêremya ji wan re got:
Hûn ê ji Tsedekiya re wusa bi-
bêjin: 4 Xwedayê Îsraêlê XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê haletên
cengê yên di destên we de ne, ên
ku hûn li dijî Kildaniyên ku ji der-
veyî dîwaran dor û ber li we gir-
tine û li dijî qiralê Babîlê bi wan
ve cengê dikin şunda vegerînim û
wan di navenda vî bajarî de bici-
vînim. 5 Û ez ê li dijî we bi destê
hatiye dirêj kirin û bi bazûya dij-
war, heta bi hêrs û bi xeydê û bi
xezebekî mezin cengê bikim. 6 Û
ez ê li yên ku li vî bajarî rûdinin,
li mirov jî û li heywan jî bixim û
dê bi webayekî mezin bimirin! 7 Û
paşî wê, XUDAN dibêje, ez ê Tse-
dekiyayê qiralê Cihûdayê û qûlên
wî û netewê, yên ku li vî bajarî ji
ber webayê, şûr û xelayê mayîne,
bidim destê Nebûkadnetsarê qiralê
Babîlê û destê neyarên wan û ez ê
bidim destê yên ku li canên wan
digerin û dê wan ji şûr ve derbas
bikin û wan neparêzin û dilê wî bi
wan dê neşewite û dê dilovaniyê
neke!
8 Û tuyê ji vê netewê re bibêje:
XUDAN wusa dibêje: A vay, ez
rêya jiyanê û rêya mirinê datî-
nim ber we. 9 Yê ku li vî bajarî
bimîne, dê bi şûr û bi xelayê û bi
webayê ve bimirin; lê belê zilamê
ku derkeve cem Kildaniyên ku
dor û ber li we girtine û bikeve,
dê sax bimîne û dê canê wî jê re
bibe malekî talanê. 10 Ji ber ku
min berê xwe ne bona qenciyê,
lê belê bona xerabiyê da vî bajarî,
XUDAN dibêje; dê ji destê qiralê
Babîlê ve bête dayîn û dê wê bi
agir vêxe!

*Daraziya li dijî Qiralên xerab*

11 Û bona mala qiralê Cihûdayê
gotina XUDAN guhdarî bikin!
12 Ya mala Dawid, XUDAN wusa
dibêje: Sibehê dadiyê bikin û yê ku
hatiye şelandin ji destê zordest xe-
las bikin, ya na dê ji ber xerabiya
karên we hêrsa min mîna agir der-
keve û bişewitîne û dê tu kesê ku
wê bitefîne tune be! 13 A vay, ez
li dijî te me, ya tu, yê ku li newalê,
li zinarê deştê rûdinê, XUDAN
dibêje, hûn ku: Ma kî dadikeve ser
me? Û ma kî dikeve şunwarên me?
dibêjin. 14 Û ez ê li gor hilberê
karên we sehêtiyê li we bikim,
XUDAN dibêje û ez ê di daristana
wî de agir vêxim û dê hemûya dora
wê bixwe û biqedîne!

22 XUDAN wusa got: Dake-
ve mala qiralê Cihûdayê û
li wir vê gotinê bibêje 2 û bibêje:
Gotina XUDAN guhdarî bike ya
qiralê Cihûdayê, yê ku li ser tex-

ta Dawid rûdinê, tu û qûlên te û
netewa te, hûn ku, ji van deriyan
ve derbas dibin! 3 XUDAN wusa
dibêje: Rastî û dadiyê bikin û yê
ku hatiye şelandin ji destê zordest
ve xelas bikin û neheqiyê li xerîb,
sêwî û jinebiyê re nekin, zordesti-
yê nekin û li vê derê xwîna bêsûc
nerijînin. 4 Ji ber ku ger hûn bi
rastî vî tiştî bikin, wê gavê qiralên
ku li ser texta Dawid rûniştine dê
li erebeyan û li hespan siwar bi-
bin, ew û qûlên wî û netewa wî dê
ji deriyê vî xaniyî ve derbas bibin.
5 Lê belê ger hûn van gotinan
guhdarî nekin, XUDAN dibêje,
ez li ser xwe sondê dixwim ku, dê
ev xanî xera bibe!
6 Ji ber ku XUDAN ji bo mala
qiralê Cihûdayê wusa dibêje:
Tu bona min Gîlead e û sertapa
Lubnanê ye; lê belê bi rastî, ez ê
te bikim çolek û bajarên ku kesî
tê de rûnê nîne! 7 Û li dijî te, her
yek çekên wan di destên wan de
ez ê helaqkiran amade bikim û dê
darên te yî erzê yên bijartî jê bikin
û dê wan bavêjin agir. 8 Û dê pirr
netewe ji cem vî bajarî derbas bi-
bin û dê her kes ji cîranê xwe re
bibêje: Gelo çima XUDAN li vî
bajarê mezin re wusa kir? 9 Û dê
wusa bibêjin: Ji ber ku wan dev ji
peymana Xwedayê xwe XUDAN
berdan û ji îlahên wekî din re pe-
ristinê kirin û ji wan re qûlitiyê
kirin!

*Daxuyaniya di derbarê Qiral Şallûm de*

10 Bona yê miriye negirîn û bona
wî li xwe nexin; lê belê bona yên
ku diçe bi jan bigirîn, ji ber ku
êdî dê venegere û dê welatê ku
lê bûyiye êdî nebîne! 11 Ji ber
ku XUDAN, bona Şallûmê lawê
Yoşiyayê ku li dêvila bavê xwe
Yoşiya bûye qiral û ji vê derê der-
ketiye û çûye, wusa dibêje: Dê êdî
venegere vê derê; 12 lê belê dê li
cîhê ku wî bi sirgûnî birine bimire
û êdî dê vî warî nebîne!

*Daxuyaniya di derbarê Qiral Yehoyakîm de*

13 Wey li wî zilamê ku, mala xwe
bi neheqiyê û odeyên xwe bi bêda-
diyê ve ava dike, cîranê xwe li
dêvla vala dixebitîne û mîşeyê wî
nade wî: 14 Ez ê ji xwe re malek
fireh û odeyên hewadar ava bikim,
dibêje û bona xwe şivakeyan ve-
dike û bi darê erzê dixumîne û bi
sorê ve boyax dike! 15 Ma tu bi
zêdeyî kom kirina darê erzê qi-
raletiyê dike? Ma bavê te xwar û
vexwar û dadî û rastiyê nekir? Wê
çaxê bona wî qenc bû. 16 Doza
zebûn û xizan dît; wê gavê qenc
bû. Ma nas kirina min ne ew e?
XUDAN dibêje. 17 Lê belê çavên
te û dilê te tenê di qezenca te yî
xerab de û di xwîna bêsûc de û
bona ku bikî di xedarî û zordestiyê
de ne! 18 Ji ber vê yekê XUDAN
bona Yehoyakîmê lawê Yoşiyayê

qiralê Cihûdayê wusa dibêje: Dê
bi gotina: Wax birayê min! Wax
xwuşka min! Wax efendiyê min!
Ax mirêsiya wî! bona wî li xwe
nexin. 19 Dê bi kaş kirinê û ji de-
riyên Orşelîmê ve dûr bête avêtin,
mîna ku ker bête binax kirin, dê
wî binax bikin!

*Daxuyaniya di derbarê Qiral Yehoyakîn de*

20 Hilkişe Lubnanê û feryadê bike
û li Başanê dengê xwe bilind bike
û ji Abarîmê feryadê bike; ji ber
ku hemû leyistikên te şikestiyan!
21 Dema karên te qenc diçûn, ji te
re gotim; lê belê te got: Ez guh-
darî nakim. Ji zarokantiya te ve
rêya te ew e; tu gotina min guh-
darî nake. 22 Dê ba hemû zarokên
te biçêrîne û leyistokên te dê biçin
sirgûnê; wê gavê tuyê ji ber hemû
xerabiya xwe bi rastî jî şermezar
bibe û tuyê rusway bibe. 23 Ya
tu, yê ku li Lubnanê rûdinê, yê ku
hêlîna xwe di darên erzê de ava
dike, dema mîna pîreka ku dizê
jan û êş werin te, tuyê çiqasî di
rewşekî jandar de be[1]!

*Daxuyaniya di derbarê Orşelîmê de*

24 Konyayê lawê Yehoyakîmê
qiralê Cihûdayê, ger li ser destê
minî rast gustîlka morê bûba jî,
bona heqê hebûna min, XUDAN
dibêje, dîsa min ê te ji wir derxista
25 û ez ê te bidim destê yên ku li
canê te digerin û destê zilamên ku
tu ji wan bêzar bûye, Nebûkadnet-
sarê qiralê Babîlê û destê Kildanî-
yan. 26 Û ez ê te û dayika te ya
ku te aniye dinê, bavêjim warekî
din ya ku hûn lê nehatine dinê û
hûn ê li wir bimirin. 27 Lê belê
dê venegerin wir, warê ku canên
wan dixwazin vegerinê! 28 Ma ev
kesê Konya, qey sihûnek şikestî û
hatiye biçûk dîtine yî? Feraxek tu
kes naecibîne yî? Ma çima ew û
nîjada xwe hatin avêtinî derve û
hatin avêtinî warekî ku pê niza-
nin? 29 Welat, ya welat, gotina
XUDAN guhdarî bike, ya welat!
30 XUDAN wusa dibêje: Vî zi-
lamî, wekî zilamekî ku dê di rojên
xwe yî bê zarok de karê wî qenc
neçe binivîsînin; ji ber ku êdî dê
di nîjada wî de, kesî ku karê wî
qenc diçe û li ser texta Dawid ve
rûdinê tune be!

*Şivanên sexte û Qiralê Rasteqîn Mesîh*

Hêz 34; Zek 11,15-17

23 Wey li serê şivanên ku
mîhên çêregehên min tune
kirine û belav kirine! XUDAN
dibêje. 2 Ji ber vê yekê Xwedayê
Îsraêlê XUDAN, li dijî şivanên
ku netewa min dajon wusa dibêje:
We keriyê min belav kirin û qe-
wirandin û hûn li wan negeriyan;

1 Di rewşekî ku dil pê dişewitê de be!

a vay, ez ê li ser we sehêtiya xe-
rabiya karên we bikim, XUDAN
dibêje. 3 Û ez ê ji hemû welatên
ku wan ajotime li pêymayiyên
keriya xwe bidim hev û ez ê wan
dîsa bînim çêregehên wan û dê bi
hilber bin û zêde bibin. 4 Û ez ê
şivanên ku wan bajon bi ser wan
ve deynim û dê êdî netirsin û dê
nekevin bêzariyê û kêm nebin,
XUDAN dibêje.
5 A vay, rojên ku ez ê ji Dawid re
Ajdanekê Rehê yê salih derxînim
tên, XUDAN dibêje û dê mîna
qiralekî qiraltiyê bike û dê biaqilî
bike û dê li welêt rastî û dadiyê
bike. 6 Dê di rojên wî de Cihûda
xelas bibe û dê Îsraêl di ewlekari-
yê de rûnê û navê ku dê pê bangî
wî bikin ew e: XUDAN rastiya[1]
me ye! 7 Ji ber vê yekê, XUDAN
dibêje, a vay, êdî rojên ku dê ne
bi gotina: Bona mafê hebûna XU-
DANê ku lawên Îsraêl ji Misirê
derxistiye! 8 lê dê bibêjin: Bona
mafê hebûna XUDANê ku nîja-
da mala Îsraêlê ji welatên bakur,
ji hemû welatên ku wan ajotime
derxistiye û aniye! tên. Û dê ew ê
di axa xwe de rûnin.

*Peyxamberên sexte yên Cihûdayê*
L. Yêr 2,14; Hêz 13

9 Ji ber peyxamberan, di hundirê
min de dilê min şikest, hemû hes-
tiyên min sist bûn; ji ber XUDAN
û ji ber gotinên wî yên pîroz ez
mîna zilamekî serxweş im û mîna
zilamê ku xemr wî bi bin ve xis-
tiye me. 10 Ji ber ku welat bi
zinêkiran ve tijî ne; ji ber ku ji
ber naletê welat şînê dikişîne;
çêregehên çolê ziwa bûn. Û rêya
wanî revê xerab û qudreta wan ne
rast e; 11 ji ber ku peyxamber jî,
kahîn jî bêbawer in; heta di mala
xwe de jî xerabiya wan dîtim!
XUDAN dibêje. 12 Ji ber vê yekê
dê rêyên wan ji wan re bibin mîna
cîhê ku di nav tariyê de şematokî
ne û ji wir dê bên qewirandin û li
wir bikevin; ji ber ku ez ê xerabi-
yê bi ser wan ve bînim, ez ê sala
sehêtî kirina wan bînim! XUDAN
dibêje.
13 Û di peyxamberên Samîriyê
de bêaqiltiyan dîtim; bi Baal re
peyxambertiyê kirin û netewa
min Îsraêlê çewt kirin. 14 Di pey-
xamberên Orşelîmê de jî tiştekî
tirsehêz dîtim; zinê dikin û di
rêya derewê de dimeşin û destê
yên ku xerabiyê dikin xwurt dikin
û bi vî awayî tu kes ji rêya xwe
yî xerab ve venagere; gişt bona
min mîna Sodomê û yên ku li wir
rûdinin bûn mîna Gomorra. 15 Ji
ber vê yekê bona peyxamberan
XUDANê artêşan wusa dibêje: A
vay, ez ê gîhayê pêlînê bi wan bi-
dim xwarin û ava ziravikê bidim
vexwarin; ji ber ku bêxwedayî

[1] Dadmendi, başbûn, çêbûn.

ji peyxamberên Orşelîmê ve ji
hemûya welêt re derketin.
16 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Gotinê peyxamberên ku peyxam-
bertiyê ji we re dikin guhdarî
nekin; tiştên vala hînî we dikin;
ne ji devê XUDAN, xewn û xe-
yala dilên xwe dibêjin. 17 Ji yên
ku min biçûk dibînin re her tim
dibêjin: XUDAN: Dê ji we re
xweşî bibe! got û ji her kesê ku di
inyada dilê xwe de dimeşin re: Dê
xerabî bi ser we ve neyê! dibêjin.
18 Ji ber ku, ma kî di civata XU-
DAN de sekinî ku bila bibîne
û gotina wî bibihîze? Ma kî go-
tina wî qenc guhdarî kir û bihîst?
19 A vay, hêrsa XUDAN, baho-
za wî, bahoza bi hêz derket; dê
bi serê xeraban ve biteqe! 20
Heta ku miraza dilê xwe neke û
di wê de serfiraz nebe, dê hêrsa
XUDAN aş nebe; di rojên dawîn
de hûn ê baş ji wê fêhm bikin!
21 Min van peyxamberan neşand,
lê ew bi xwe baz dan; ji wan re
negotim, lê wan bi xwe peyxam-
bertiyê kirin. 22 Lê belê ger di ci-
vata min de bisekiniyana, dê go-
tinên min bigihanda netewa min û
dê ji rêyên wanî xerab, ji xerabiya
karên wan, wan vegerandina!
23 XUDAN dibêje: Ez ji nêzîkê
ve Xwedê me, lê ma ji dûr ve ne
Xwedê me? 24 Ma tu kes dikare
li cîhê veşartî xwe veşêre ku ez
wî nebînim? XUDAN dibêje. Ma
ezmanan û erdê ez danagirim?
XUDAN dibêje. 25 Gotina ku
peyxamberên bi navê min pey-
xambertiyên derew dikin: Xewn
dîtim, xewn dîtim! di ber xwe de
digotin bihîstim. 26 Ma dê heta çi
wextî di dilê peyxamberên ku bi
derewan peyxambertiyê dikin de
ev tişt bibe? Ew ku, peyxamberên
fenekiya dilên xwe ne; 27 ew ku,
her yek ji wan bi xewnên xwe
yên ku ji cîranên xwe re dibêjin,
difikirin ku dê bi wan, navê min
ji netewa min re bidin ji bîr ki-
rin, çawa ku, bapîrên wan di oxra
Baal de navê min ji bîr kiribûn.
28 Peyxamberê ku tê de xewn
heye, bila xewnê bibêje; yê ku
gotina min tê de heye jî bila bi dil-
sozî gotina min bibêje! Ma li cem
genim ka çî ye? XUDAN dibêje.
29 Ma gotina min ne mîna agir û
kulunka ku zinaran perçe perçe
dike yî? XUDAN dibêje. 30 Ji ber
vê yekê, a vay, ez li dijî peyxam-
beran im, XUDAN dibêje, ewên
ku, ji hev û din gotinên min didi-
zin. 31 A vay, ez li dijî peyxam-
beran im, XUDAN dibêje, ewên
ku, zimanên xwe duşuxulînin û
dibêjin: Ew dibêje! 32 A vay, ez li
dijî yên ku peyxambertiya xewnê
derewîn dike me, XUDAN dibêje
û wan dibêjin û bi derewên xwe
û bi pesnahiyên xwe yî vala ne-
tewa min çewt dikin û min wan
neşandin û emir li wan nekirim

û ji vê netewê re tu fêdeyên wan
nîne, XUDAN dibêje.
33 Û dema ji vî gelî ve kesek, an
jî peyxamberek, an jî kahînek, bi
gotina: Barê XUDAN çî ye? ji
te bipirsin, tuyê ji wan re bibêje:
Kîjan bar! Ez ê we ji ser xwe ba-
vêjim! XUDAN dibêje. 34 Dema
em werin peyxamber û kahîn û
zilamê ji gelên ku dê bibêje barê
XUDAN, ez ê sehêtiyê li wî zi-
lamî û li mala wî jî bikim! 35 Her
yekê we ji cîranê xwe re û her
yekê we ji birayên xwe re hûn ê
wusa bibêjin: XUDAN çi bersivê
da? Û: XUDAN çi got? 36 Û êdî
hûn ê barê XUDAN di bîra xwe
de neynin; ji ber ku dê gotina her
kesî bibe barê wî; ji ber ku we go-
tinên Xwedayê ku zindî ye, XU-
DANê artêşan, gotinên Xwedayê
me guhertin. 37 Tuyê ji peyxam-
ber re wusa bibêje: XUDAN çi
bersivê da te? Û: XUDAN çi got?
38 Û ger hûn: Barê XUDAN bi-
bêjin, ji ber vêya XUDAN wusa
dibêje: Madem ku hûn vê gotinê;
gotina: Barê XUDAN dibêjin û
min jî bi gotina: Hûn ê nebêjin
barê XUDAN, ji we re şandim.
39 Ji ber vê yekê, a vay, ez ê
bitûmî we ji bîr bikim û ez ê we û
bajarê ku dabûm we û bapîrên we
ji hemberî xwe bavêjim 40 û ez ê
şermezariyek abadîn û ruswayti-
yek abadîn, ya ku nayê ji bîr kirin
bînim ser we!

*Du selik Hêjîr*

24 Paşî ku Nebûkadnetsarê
qiralê Babîlê, Yekonyayê
lawê Yehoyakîmê qiralê Cihû-
dayê û serokên Cihûdayê û xwe-
dî çand û hesinkeran ji Orşelîmê
sirgûn kirin û birin Babîlê, XU-
DAN nîşanî min da û a vay, du
selik hêjîrên ku danîne ber pe-
restgeha XUDAN. 2 Di selikekê
de hêjîrên zehf qenc hebûn, mîna
hêjîrên nûber; di selika din de jî
hêjîrên hingî xerab in ku nayên
xwarin, hêjîrên zehf xerab hebûn.
3 Û XUDAN ji min re got: Ma
tu çi dibînî, Yêremya? Û min got:
Hêjîran, hêjîrên ku zehf qenc, pirr
baş in û yên xerab, pirr xerab,
hêjîrên ku ji ber xerab in nayên
xwarin.
4 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 5 Xwedayê Îsraêlê XUDAN
wusa dibêje: Ez ê sirgûnên Cihû-
dayê, ên ku bona qencî be ji vî
cîhî şandime warê Kildaniyan,
di çavê xwe de mîna van hêjîrên
qenc bigirim. 6 Û bona ku qencî
be dê çavê min li ser wan be û ez ê
wan dîsa bînim vî warî û ez ê wan
ava bikim û ez ê wan têk nebim
û ez ê wan biçikînim û wan rana-
kim. 7 Bona min, Xwedê bûna
min binasin ez ê dil bidim wan û
dê ew ê ji min re bibin netewe û
ez ê ji wan re bibim XUDAN; ji
ber ku dê bi giştika dilê xwe ve-
gerin min.

8 Bi rastî XUDAN wusa dibêje:
Tsedekiyayê qiralê Cihûdayê û
serokên wî û maweyê Orşelîmê
yê ku li vî warî ji ber wan maye û
yên ku li warê Misirê rûdinin, ev
hêjîrên xerab çawa bin, ez ê wusa
bidim dest, ew hêjîran ku, ji ber
xerab in nayên xwarin. 9 Ji bo xe-
rabiyê, bona di nav welatê dinê de
bi vir ve û bi wir ve bên avêtin, di
hemû cîhên ku ez ê wan bajom de
bona ku bibin şerm û methelok,
qerf û naletî ez ê wan bidim dest.
10 Û heta ku ji ser axa ku dabûm
wan û bapîrên wan bên paqij kirin
û biqedin ez ê şûr û xela û webayê
bişînim nav wan!

*Sirgûniya Heftê salî*

Dan 1,1-6; 2.Dîr 36,20-23

25 Di sala çaremîn ya Yeho-
yakîmê lawê Yoşiyayê qi-
ralê Cihûdayê de, ev sala pêşîn ya
Nebûkadnetsarê qiralê Babîlê ye;
gotina ku bona hemûya netewa
Cihûda ji Yêremya re hatiye ye
2 û hemûya netewa Cihûda re û
bi heçiyên ku li Orşelîmê rûdinin
re, Yêremya peyxamber vê gotinê
gîhand û got: 3 Ew bîst û sê sal,
ji sala sêzdehan ya Yoşiyayê lawê
Amonê qiralê Cihûdayê heta îroj,
gotina XUDAN ji min re hat û bi
lez kirin û gotinê, min jî wê ji we
re got; lê belê we guhdarî nekirin.
4 Û XUDAN bi lezî pê kir û hemû
qûlên xwe yî peyxamber ji we re
şand, lê belê we guhdarî nekirin û
bona bihîstinê we guh nedan û wî
got: 5 Niha her kes ji rêya xwe yî
xerab û ji xerabiya karên xwe ve-
gerin û ji demên kevin heta abadîn-
an li ser axa ku XUDAN daye we
û bapîrên we rûnin 6 û bona ku ji
îlahên wekî din re qûlitiyê bikin û
peristinê bikin li pêy wan nerin û
bi karên destên xwe ve min hêrs
nekin; ez jî xerabiyê bi we nekim!
7 Û XUDAN dibêje: Bi karê des-
tên xwe, bona xesara xwe ji bo ku
min hêrs bikin, we min guhdarî
nekirin! 8 Ji ber vê yekê XUDANê
artêşan wusa dibêje: Madem ku we
gotinên min guhdarî nekirin, 9 a
vay, ez ê jî bişînim û hemû eşîrên
bakurê rahêjim, XUDAN dibêje û
ez ê ji qûlê xwe Nebûkadnetsarê
qiralê Babîlê re bişînim û li dijî vî
warî û li dijî yên ku lê rûdinin û bi
dorûber li dijî hemû van neteweyan
ez ê wan bînim û ez ê vana bitûmî
tune bikim û ez ê bikim tiştekî şaş
kir û jê re difikin û wêranxaneyên
abadîn. 10 Û ez ê dengê dilşayiyê
û dengê kêfxweşiyê û dengê zava
û dengê bûkê, dengê kevirên aşê û
tîrêja qendîlê ji wan rakim. 11 Û dê
hemûya vî warî bibe wêraneyek û
tiştekî şaşkir û dê van neteweyan
heftê salî qûlitiyê ji qiralê Babîlê
re bikin.
12 Û dê wusa bibe ku, dema heftê
sal tijî bibe, XUDAN dibêje, ji
ber fesadiyên wan ez ê sehêtiyê li

qiralê Babîlê û li wî gelî û li warê
Kildaniyan bikim û ez ê wê bikim
wêranxaneyên abadîn. 13 Hemû
gotinên min ên ku li dijî wê gotim
e, her tiştên di vê pirtûkê de nivî-
sandî ne ên ku Yêremya bi wan li
dijî hemû neteweyan peyxamber-
tiyê kirine, ez ê bînim ser wî warî.
14 Ji ber ku gellek neteweyan û
qiralên mezin dê wan, wan jî ji
xwe re bikin dîl û li gor kirinên
wan û li gor karên destên wan ez
ê bidim wan.

*Kaseya XUDAN ya hêrsê*

15 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê XU-
DAN ji min re wusa dibêje: Ji
destê min ve vê tasa xemra hêrsê
rahêle û wê bi hemû neteweyên
ku ez ê te ji wan re bişînim re bide
vexwarin! 16 Û dê ew ê vexwin û
tilpekî bibin û ji ber şûrê ku ez ê
bişînim nav wan, dê dîn û har bi-
bin! 17 Wê gavê tasê ji destê XU-
DAN ve rahiştim û bi hemû nete-
weyên ku XUDAN min ji wan re
şandiye re dam vexwarin; 18 bona
ku îroj wusa ye bibin wêraneyek,
tiştekî ku lê tê şaşkirin, fîkandin û
bibin bi naletî bi Orşelîmê û bi ba-
jarên Cihûdayê re û ji qiralên wan
re û bi serokên wan re 19 û bi qi-
ralê Misirê Fîrawûn re û bi qûlên
wî re û bi serokên wî û bi hemû
netewa wî re 20 û bi hemû nete-
wa tevlihev re û bi hemû qiralên
warê Ûtsê re û bi hemû qiralên
warê Filistînê re û bi Aşkelonê re
û bi Gazzê re û bi Ekronê û bi yên
ku ji ber Aşdodê mayîne re; 21 bi
Edomê û Moabê û bi lawên Am-
mon re 22 û bi hemû qiralên Sûrê
re û bi hemû qiralên Saydayê re
û bi qiralên giravaya li wêdetira
behrê ne re; 23 bi Dedan û Tema-
ya û Bûzê û bi hemûyên ku serê
rîhên wan jêkirîne re 24 û bi hemû
qiralên bajarên .Ereb û bi hemû
qiralên neteweya tevlihev ya ku
li çolê rûdine re 25 û bi hemû qi-
ralên Zimriyê û bi hemû qiralên
Elemê û bi hemû qiralên Medan
26 û dûr û nêzîk re, bi dor bi hemû
qiralên bakur û bi hemû welatên
dinê ên ku li rûyê erdê ne re dam
vexwarin; dê qiralê Şeşakê jî paşî
wan vexwe!

27 Û tuyê ji wan re bibêje: Xwe-
dayê Îsraêlê, XUDANê artêşan
wusa dibêje: Vexwin ku hûn
serxweş bikevin û verşin û ji ber
şûrê ku ez ê bişînim nav we bike-
vin û ranebin. 28 Û dê wusa bibe
ku, ger nexwazin ku bona vexwa-
rinê tasê ji destê te rahêlin, tuyê ji
wan re bibêje: XUDANê artêşan
wusa dibêje: Helbet hûn ê vexwin.
29 Ji ber ku a vay, ez li bajarê ku
navê min lê ye dest bi anîna asîwan
dikim û ma hûn tu carî bêceza
dimînin? Hûn ê bê ceza nemînin;
ji ber ku ez ê li ser hemûyên ku li
dinê rûdinin bangî şûrekê bikim,
XUDANê artêşan dibêje.

30 Ji ber vê yekê li dijî wan pey-
xambertiya van gotinan bike û
ji wan re bibêje: Dê XUDAN ji
bilindahiyê ve bigurme û dê ji
şunwara xwe yî pîroz ve deng
bide; dê li dijî çêregeha xwe bi
xwurtayî bigurme; li dijî hemûyên
ku li dinê dijîn, mîna yên ku tirî
didewisînin biqêre. 31 Dê galegal
bigihêje nîçikê erdê; ji ber ku doza
XUDAN bi neteweyan re heye;
dê bi hemûya mirovan re darazî
bibe; dema em werin xeraban, dê
wan bide şûr, XUDAN dibêje.
32 XUDANê artêşan wusa dibêje:
A vay, dê ji netewê, asîw ji netewê
re derkeve û dê ji nîçikên dinê re
bahoza mezin biteqe. 33 Û ew roj
dê ji nîçikek erdê heta nîçika dinî
erdê zilamên ku XUDAN wan
kuştiye hebin; dê bona wan şînê
girê nedin û dê ew neyên hevdan
û binax kirin; dê li rûyê axê ve
bibin zibil. 34 Biûrin ya şivanno
û feryadê bikin! Û yên ku ji kerî
re bûne serî, di xweliyê de bige-
vizin! ji ber ku bona serjê kirinê
rojên we tijî bûn û ez ê we belav
bikim û hûn ê mîna feraxekî bi-
qîmet bikevin. 35 Û dê ji şivanan
re rêya revê û ji yên ku ji kerî re
bûne serî re rêya xelasiyê nemîne.
36 Dengê feryada şivanan û ûrîna
yên ku ji kerî re bûne serî! Ji ber
ku XUDAN çêregehên wan xera
dike. 37 Û ji ber hêrsa XUDAN ya
sor di çêregehên xweşiyê de deng
nema. 38 Mîna şêrê ciwan dev ji
qula xwe berda; ji ber ku welatê
wan, ji ber hêrsa şûrê xedar û ji
ber xeyda wî yî sor wêran bû.

*Gel kuştina Yêremya dixwaze*

26 Di destpêka qiraletiya Ye-
hoyakîmê lawê Yoşiyayê
qiralê Cihûdayê de ev gotin ji
XUDAN ve hat: 2 XUDAN
wusa dibêje: Di hewşa mala XU-
DAN de bisekine û hemû van
gotinên ku bona tu ji wan re bi-
bêje ji te re emir kirime, ji hemû
bajarên Cihûdayê, ên ku bona
peristinê werin mala XUDAN
re bibêje; gotinekê kêm neke!
3 Dibe ku guhdarî bikin û her kes
ji rêya xwe yî xerab vegerin ku,
ez jî ji asîwa ku ji ber xerabiya
karên wan, min ê bianiya serê wan
poşman bibim. 4 Û tuyê ji wan re
bibêje: XUDAN wusa dibêje: Ger
bona ku hûn di zagona min ya ku
danîme ber we de bimeşin, 5 ger
hûn bona gotinên qûlê min pey-
xamberên ku hûn wan guhdarî na-
kin, yên ku min ji we re şandiye,
bi lezî tevgerînê kirime û ji we re
şandime bibihîzin min guhdarî
nekin; 6 wê gavê ez ê vê malê
bikim mîna Şîloyê û ez ê bona
hemû netewê dinê, vî bajarî bi
naletî bikim! 7 Û dema Yêremya
di mala XUDAN de van gotinan
digotin, kahînan û peyxamberan û
hemûya netewê bihîstin.

8 Û wusa bû ku, dema hemûyên
tiştên ku XUDAN bona ji hemûya
netewê re bibêje jê re emir ki-
ribûn, Yêremya got û qedandin,
kahînan, peyxamberan û hemûya
netewê bi wî girtin û gotin: Divê
muheqeq tu bimire! 9 Ma çima te
bi navê XUDAN, bi gotina: Dê ev
xanî bibe mîna Şîloyê û dê ev ba-
jar xera bibe, kesî ku tê de rûnê dê
nebe? Û hemûya netewê di mala
XUDAN de li ser Yêremya ve
kom bûn.
10 Û dema van tiştan bihîstin,
serokên Cihûdayê ji mala qiral
derketin hatin mala XUDAN û li
cîhê ketina deriyê nû ya di mala
XUDAN de rûniştin. 11 Wê çaxê
kahînan û peyxamberan bi se-
rokan re û bi hemûya netewê re
axifîn û gotin: Vî zilamî mirinê
li xwe heq kir; ji ber mîna ku we
bi guhên xwe ve bihîstin, li dijî vî
bajarî peyxambertiyê kir! 12 Wê
gavê Yêremya bi hemû serokan û
bi hemûya netewê re got û bi wan
re axifî: Bona ez li dijî vî xaniyî
û li dijî vî bajarî peyxambertiya
hemû wan gotinên ku we bihîstin
bikim, XUDAN min şand. 13 Û
niha karên xwe û rêyên xwe baş
bikin û gotina Xwedayê xwe XU-
DAN guhdarî bikin û dê XUDAN
ji xerabiya ku li dijî we gotiye
poşman bibe. 14 Û ez jî, a vay, ez
di destê we de me, li gor ya ku di
çavên we de rast û qenc e bikin!
15 Lê qenc bizanibin ku, ger hûn
min bukujin, dê wusa bibe ku hûn
ê berdêla xwîna bêsûc bînin ser
xwe û ser vî bajarî û ser yên ku
lê rûdininê; ji ber bona hemû van
gotinan ji we re bibêjim, bi rastî
XUDAN min ji we re şand!
16 Û serokan û hemûya netewê ji
kahînan û peyxamberan re gotin:
Bona vî zilamî daraziya mirinê
nabe, ji ber ku bi navê Xwedayê
me XUDAN ji me re got. 17 Û
çend kes ji kalepîrên welêt rabûn
û bi hemû civaka netewê re axi-
fîn û gotin: 18 Di rojên Hîzki-
yayê qiralê Cihûdayê de Mîkayê
Moreşetî peyxambertiyê kir û bi
hemûya civaka Cihûdayê re axi-
fî û got: XUDANê artêşan wusa
dibêje: Dê Siyon mîna zeviyê bête
ajotin û dê Orşelîm bibe komikên
keviran û dê çiyayê perestgehê
bibe mîna cîhên bilind yên da-
ristanê! 19 Ma Hîzkiyayê qiralê
Cihûdayê û hemûya Cihûdayê wî
kuştin? Ma ji XUDAN netirsiya
û sayedariya XUDAN nexwest û
XUDAN ji ber xerabiya ku li dijî
wan gotiye poşman nebû? Lê em
jî dê wusa bibe ku, xerabiya me-
zin bi canê xwe re bikin!

*Qiral Yehoyakîm Ûriya dikuje*

20 Û zilamekî din ê ku bi navê
XUDAN ve peyxambertiyê dikir
hebû, ji Kîryat-Yearîmê Ûriyayê
lawê Şemaya û li dijî vî bajarî û li

dijî vî welatî, li gor hemû gotinên
Yêremya peyxambertiyê kir. 21 Û
qiral Yehoyakîm û hemû egîdên
wî û hemû serokan gotinên wî
bihîstin û qiral xwest ku wî buku-
je; lê belê dema Ûriya vêya bihîst
tirsiya û reviya çû Misirê. 22 Û
qiral Yehoyakîm zilaman şand
Misirê, tevî Elnatanê lawê Akbor
zilaman şand 23 û Ûriya ji Misirê
ve derxistin û wî ji qiral Yeho-
yakîm re anîn û bi şûr li wî xist
û laşê wî avêt nav gorên gel, yên
nizm[1]. 24 Lê belê bona ku Yêrem-
ya ji bo kuştinê nedin destê gel,
yê ku bi wî girtibû destê Ahîkamê
lawê Şafan bû.

*Yêremya dibêje: Ji Qiralê Babîlê re xizmetê bikin*

2.Qir 24,17-20

27 Di destpêka qiraleti-
ya Yehoyakîmê lawê
Yoşiyayê qiralê Cihûdayê de, ji
XUDAN ev gotin ji Yêremya re
hat: 2 XUDAN ji min re wusa
dibêje: Ji xwe re benik û nîran
çêbike û wan deyne histuyê xwe
3 û bi destê şandiyên ku ji Tsedeki-
yayê qiralê Cihûda re, ji Orşelîmê
re hatine wan ji qiralê Edomê re û
ji qiralê Moabê re û ji qiralê lawên
Ammon re û ji qiralê Sûrê re û ji
qiralê Saydayê re bişîne 4 û bona
ku ji efendiyên xwe re bibêjin
emir bide wan: Xwedayê Îsraêlê,
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Hûn ê ji efendiyê xwe re ûsa bi-
bêjin: 5 Min dinê, heywan û mi-
rovê ku li rûyê erdê ne, bi qudreta
xwe yî mezin û bi bazûya xwe yî
dirêjbûyî afirand û ez wê didim yê
ku di çavê min de rast e. 6 Û niha
hemûya van welatan dam destê
qûlê xwe Nebûkadnetsarê qiralê
Babîlê û bona ku jê re xizmetê
bikin heywanên beyaran jî dam
destên wî. 7 Û heta dema welatê
wî were, dê hemûya neteweyan ji
wî re û ji lawên wî re û ji lawê
lawê wî re qûlitiyê bikin û dê wê
demê gellek netewe û qiralên me-
zin wî ji xwe re bikin kole. 8 Û dê
wusa bibe ku, kîjan netewe û gel
ji Nebûkadnetsar re qûlitiyê neke
û histuyê xwe daneyne bin nîra
qiralê Babîlê, ez wan heta ku bi
destê wî ve biqedînim, XUDAN
dibêje, ez ê bi şûr û bi xelayê û
bi webayê sehêtiyê li wê netewê
bikim. 9 Û dema em werin we,
peyxamberên xwe û remildarên
xwe û xewnên xwe û sitêrknasên
xwe û afsûnkarên xwe guhdarî
nekin, ew ku, bi gotina: Hûn ê
qûlitiyê ji qiralê Babîlê re nekin!
ji we re dibêjin; 10 ji ber, ew bona
ku we ji axên we dûr bixin û ez
we bajom ji we re peyxamberti-
ya derewîn dikin! 11 Lê belê ez
ê netewa ku histuyê xwe têxe bin
nîrê qiralê Babîlê û netewa ku

1 Avam, bêqîmet, an jî: Nehêja.

jê re qûlitiyê bike di axa xwe de
bihêlim, XUDAN dibêje û dê wê
bikarbînin û dê li wir rûnin.
12 Û li gor hemû van gotinan bi
Tsedekiyayê qiralê Cihûdayê re
axifîm û gotim: Histuyê xwe bi-
xin bin nîrê qiralê Babîlê û ji wî
re û ji netewa wî re qûlitiyê bikin
ku sax bimînin! 13 Ma çima mîna
ku XUDAN di derheqê netewa
ku dê ji qiralê Babîlê re qulitiyê
neke gotiye de, tu û netewa te bi
şûr, bi xelayê û bi webayê bimi-
rin? 14 Û: Gotina peyxamberên
ku ji we re: Hûn ê ji qiralê Babîlê
re qûlitiyê nekin dibêjin guhdarî
nekin; ji ber ku ew ji we re pey-
xambertiya derew dikin! 15 Ji
ber ku wan neşandim, XUDAN
dibêje, lê bona ku we bajom û
hûn û peyxamberên ku peyxam-
bertiyê ji we re dikin, bona tune
bibin, bi navê min peyxambertiya
derewîn ji we re dikin!
16 Û bi kahînan û bi hemûya vê
netewê re axifîm û gotim: XU-
DAN wusa dibêje: Gotinên pey-
xamberên xwe yê ku ji we re: A
vay, dê taximên mala XUDAN
niha zû ji Babîlê ve bête anîn
dibêjin, guhdarî nekin; ji ber ku
ew ji we re peyxambertiya de-
rew dikin! 17 Wan guhdarî ne-
kin; ji qiralê Babîlê re qûlitiyê
bikin ku sax bimînin! Ma çima
ev bajara xera bibe? 18 Lê belê
ger ew peyxamber bin û go-
tina XUDAN di wan de be, bila
niha ji XUDANê artêşan re lava
bikin ku, taximên li mala XU-
DAN û li mala qiralê Cihûdayê
û li Orşelîmê ji ber mayîne, bila
ji Babîlê re neyên birin! 19 Ji ber
ku bona sitûnan û bona behrê û
bona pêldankan û bona taximên
ku li vî bajarî mayîne, XUDANê
artêşan wusa dibêje: 20 Belê,
dema Yekonyayê lawê Yehoya-
kîmê qiralê Cihûdayê û hemû
pêşhatiyên Cihûdayê û Orşelîmê
ji Orşelîmê ajotin Babîlê, bona
taximên ku qiralê Babîlê Nebû-
kadnetsar wan nebiriye, 21 ên ku
li mala XUDAN û li mala qiralê
Cihûdayê û yên li Orşelîmê mayî-
ne, Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: 22 Dê ew ê ji
Babîlê re bên birin û heta roja ku
ez ê sehêtiyê li wan bikim, dê li
wir bimînin, XUDAN dibêje; wê
gavê ez ê wan derxînim û şunda
bînim vê derê.

*Hananyayê Peyxamberê sexte*

28 Û wê salê, di destpêka qi-
raletiya Tsedekiyayê qiralê
Cihûdayê de, di sala çaremîn de,
di meha pêncan de wusa bû ku,
peyxamber Hananyayê lawê Az-
zûrê Gîbeonî, di mala XUDAN
de li ber kahînan û hemûya nete-
wê bi min re axifî û got: 2 Xwe-
dayê Îsraêlê, XUDANê artêşan
wusa dibêje: Nîrê qiralê Babîlê

şikandim. 3 Ez ê di hundirê dema
du salî de, hemû taximên mala
XUDAN ên ku qiralê Babîlê Ne-
bûkadnetsar ji vir rahiştiye û biri-
ye Babîlê şunda bînim vê derê 4 û
ez ê Yekonyayê lawê Yehoyakîmê
qiralê Cihûdayê û hemû sirgûnên
Cihûda, yên ku çûne Babîlê bînim
vê derê, XUDAN dibêje; ji ber ku
ez ê nîrê qiralê Babîlê bişkînim!
5 Wê gavê peyxamber Yêremya li
ber kahînan û li ber hemû netewa
ku di mala XUDAN de sekinîne
bersivê da Hananya peyxamber
6 û peyxamber Yêremya got:
Amîn! Bila XUDAN wusa
bike! Bila XUDAN van gotinên
ku te di derheqê anîna hemû
taximên mala XUDAN û hemû
sirgûnan ji Babîlê vergerandina
vir de peyxambertiyê kiriye bike!
7 Lê niha dema ku tu dibihîze
û hemûya netewê dibihîzin, vê
gotina ku ez ê bibêjim guhdarî
bike: 8 Peyxamberên ku berî min
û berî te bûn, ji dema kevin ve
li dijî gellek welatan û welatên
mezin peyxambertiya cengê û
xerabiyê û webayê kirin. 9 Ger
peyxamberek, peyxambertiya
xweşiyê bike û dema gotina ku
wî peyxamberî gotiye derkeve, bi
rastî jî peyxamberê ku XUDAN wî
şandiye yî! 10 Wê gavê peyxamber
Hananya ji histuyê peyxamber
Yêremya nîrê derxist û şikand.
11 Û Hananya li ber hemûya
netewê axifî û got: XUDAN wusa
dibêje: Ez ê bi vî awayî, di dema du
salî de, nîrê Nebûkadnetsarê qiralê
Babîlê ji histuyê hemû neteweyan
ve bişkînim! Û peyxamber
Yêremya çû rêya xwe.
12 Û paşî ku peyxamber Hanan-
ya nîr ji histuyê Yêremya rahiştî
û şikand, vê gotina XUDAN ji
Yêremya re hat: 13 Here û bi Ha-
nanya re biaxife û bibêje: XUDAN
wusa dibêje: Te nîrê dar şikand, lê
belê te li dêvila wê nîrê hesin çê-
kir! 14 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Bona ku ji Nebûkadnetsarê qiralê
Babîlê re qûlitiyê bikin, nîrê he-
sin xistim histuyên hemûyên van
neteweyan û dê ji wî re qûlitiyê
bikin û heywanên beyarê jî dam
wî! 15 Û peyxamber Yêremya
ji peyxamber Hananya re got:
Niha guhdarî bike, ya Hananya!
XUDAN te neşand; lê belê tu vê
netewê dike ewlekirên derewê.
16 Ji ber vê yekê XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê te ji rûyê erdê
ve bişînim; tuyê îsal bimire, ji ber
ku te li dijî XUDAN çewtiyê got!
17 Peyxamber Hananya jî di hun-
dirê wê salê de di meha heftemîn
de mir.

*Nameya ji yên ku li sirgûnê ne re*

29 Paşî ku qiral Yekonya û
dayika qiral û karmen-
dên serayê û serokên Cihûda û

Orşelîmê û xeratan û hesinkaran
ji Orşelîmê ve derketin; 2 gotinên
nameya ku peyxamber Yêremya
ji Orşelîmê, bi destê Gemaryayê
lawê Hîlkiya û Elasayê lawê
Şafanê ku Tsedekiyayê qiralê
Cihûdayê wan ji Babîlê re, ji
Nebûkadnetsarê qiralê Babîlê re
şandiye, 3 ji kalepîrên ber mayi-
yên sirgûnan û ji kahînan û ji pey-
xamberan û ji hemû neteweya ku
Nebûkadnetsar wan ji Orşelîmê
ajotine Babîlê re şandiye, ev in:
4 Xwedayê Îsraêlê XUDANê
artêşan ji hemû sirgûnên ku ji
Orşelîmê ajotine Babîlê re wusa
dibêje: 5 Xaniyan ava bikin û
rûnin; bexçeyan deynin û mêwên
wan bixwin. 6 Jinan bînin û bibin
bavên lawan û qîzan û ji lawên
xwe re jinan bînin û qîzên xwe jî
bidin mêr ku bila law û qîzan bînin
dinê û li wir zêde bibin û kêm ne-
bin! 7 Û li xweşiya ku bajarê we
ajotime wir, bigerin û bona wê ji
XUDAN re dua bikin, ji ber ku
bi xweşiya wê, hûn ê jî xweşiyê
bibînin! 8 Ji ber ku Xwedayê Îs-
raêlê, XUDANê artêşan wusa
dibêje: Bila peyxamberên we û
remildarên we, ên ku di nav we
de ne we nexapînin û guh nedin
xewnên ku hûn dibînin! 9 Ji ber
ku ew, bi navê min peyxamber-
tiya derewîn ji we re dikin; min
wan neşand, XUDAN dibêje.
10 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Dema ji bo Babîlê bitûmî heftê sal
biqede, ez ê li we bigerim û ez bi
anîna we yî vê derê gotina xwe yî
qenc ji we re bikim. 11 Ji ber ku
ez bi fikrên xwe yî di derheqê we
de difikirim dizanim, XUDAN
dibêje, ne fikrên xerab, lê di da-
wiya we de, bona ku hêviyê bide
we, fikrên xweşiyê ne. 12 Û hûn
ê bangî min bikin û hûn ê herin û
ji min re dua bikin û ez ê we bi-
bihîzim. 13 Û hûn ê li min bigerin
û dema hûn bi hemûya dilê xwe
li min bigerin hûn ê min bibînin.
14 Û ez ê xwe bi we re bidim
dîtin, XUDAN dibêje û ez ê we
ji sirgûniyê ve şunda bînim û ji
hemû cîhên ku we ajotime û ji
hemû neteweyan bidim hev, XU-
DAN dibêje û ez ê we ji wir bînim
cîhê ku we sirgûn kiribûm.
15 Madem ku we: XUDAN ji me
re li Babîlê peyxamberan derxist,
gotin: 16 XUDAN bona qiralê
ku li ser texta Dawid rûdinê û
bona hemû netewa ku li vî ba-
jarî rûdinê, bona birayên we, ên
ku bi we re derneketine sirgûnê
wusa dibêje, 17 belê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: A vay, ez ê
şûr û xela û webayê bi ser wan
ve bişînim û ez ê wan bikim mîna
hêjîrên xerabûyî ku ji xerabûna
xwe ve nayên xwarin. 18 Û ez ê
ji pêy wan bi şûr û bi xela û bi
webayê li pêy wan bidim û bona
ku di nav hemû neteweyên dinê

de bi vir û wir de bên avêtin û
bona ku di nav hemû neteweyên
ku wan qewirandime nav wan
de bi naletî û tiştek şaş kir û lê
tê fîkandin û şermezariyek bibin,
ez ê wan bidim dest; 19 ji ber
ku gotinên min guhdarî nekirin,
XUDAN dibêje, ew gotinên ku,
bi lezî kirim û qûlên xwe yî pey-
xamber ji wan re şandim; lê belê
we guhdarî nekirin! XUDAN
dibêje. 20 Bo vê yekê, ya hûn,
hemû sirgûnên ku ji Orşelîmê ve
şandim Babîlê, gotina XUDAN
guhdarî bikin!
21 Bona Ahabê lawê Kolaya û
Tsedekiyayê lawê Maaseyayê bi
navê min ji we re peyxambertiya
derewîn kirine, Xwedayê Îsraêlê
XUDANê artêşan wusa dibêje:
A vay, ez ê wan bidim destê Ne-
bûkadnetsarê qiralê Babîlê û dê li
ber çavên we li wan bixe 22 û dê ji
ber ya ku ji wan re bûne[1] hemû sir-
gûnên Cihûda ên ku li Babîlê ne,
dê naletbûnê bistînin, dê bibêjin:
Bila XUDAN te bike mîna Tse-
dekiya û Ahabê ku qiralê Babîlê
wan di agir de şewitandiye! 23 Ji
ber ku li Îsraêlê exmeqiyê kirin û
bi jinên cîranên xwe ve zinê ki-
rin û gotinên derew ên ku ji wan
re emir nedame, bi navê min ve
gotin û yê zane û şahid e ez im,
XUDAN dibêje.
24 Û tuyê bona Şemayayê
Nehelamî biaxife û bibêje:
25 Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan bi vî awayî diaxife û
dibêje: Madem ku te, ji hemûya
netewê ya ku li Orşelîmê ye û ji
kahîn Tsefanyayê lawê Maaseya
re û ji hemû kahînan re bi navê
xwe name şand û te got: 26 Bona
her zilamê ku dîn e û xwe dike
peyxamber, ji bo bila di mala
XUDAN de karmend hebin ku
tu wî zilamî li feleqê û li xeleka
hesinî bixe, XUDAN li dêvi-
la kahîn Yehoyada te kir kahîn.
27 Û niha, ma tu çima bi Yêrem-
yayê Anatotî yê ku xwe ji we re
kiriye peyxamber ve nexeyidî?
28 Ji ber ku ji Babîlê, ji me re
şand û got: Dê sirgûnî dirêj
bibe; xaniyan çêbikin û rûnin û
bexçeyan çêbikin û mêwên wan
bixwin! 29 Û kahîn Tsefanya vê
nameyê dema peyxamber Yêrem-
ya dibîhist xwend. 30 Û vê go-
tina XUDAN ji Yêremya re hat:
31 Ji hemû sirgûnan re bişîne û
bibêje: Bona Şemayayê Nehelamî
XUDAN wusa dibêje: Madem ku
Şemaya, çawa ku wî neşandime ji
we re peyxambertiyê kir û we bi
derewê re ewleyî kirin; 32 ji ber
vê yekê XUDAN wusa dibêje:
A vay, ez ê sehêtiyê li Şemayayê
Nehelamî û li nîjada wî ve bikim;
dê tu kesî wî, yên ku di nav vê
netewê de rûdinin nemîne û ew

---

[1] An jî: Yê ku hatine serê wan.

ê qenciya ku ez ê bi netewa xwe
re bikim nebîne, XUDAN dibêje,
ji ber ku li dijî XUDAN rêşaşiyê[2]
got!

*Dê Îsraêl nû bibe*
Îşa 14,1-5; 49,8-26

30 Ev gotin ji XUDAN ve
hate Yêremya: 2 Xwe-
dayê Îsraêlê XUDAN bi vî awayî
diaxife û dibêje: Hemû gotinên ku
ji te re gotime, bona xwe di pir-
tûkekê de binivîse! 3 Ji ber ku a
vay, XUDAN dibêje, rojên ku ez
ê bi ser sirgûnên netewa xwe Îs-
raêlê û Cihûdayê ve vegerim tên,
XUDAN dibêje û ez ê wan ver-
gerînim warê ku dabûm bapîrên
wan û dê wê ji xwe re bikin milk.
4 Û gotinên ku XUDAN bona Îs-
raêlê û bona Cihûdayê gotiye ev in.
5 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Me dengê lerizandinê bihîstin, ne
dengê aştiyê, yê toqînê! 6 Niha
bipirsin û bibînin, gelo zilamek
dizê? Ma çima mîna her pîreka
ku diwelidîne destê her egîdî di
pişta wan de dibînim û hemû wec
çilmisîne? 7 Heyf e! Ji ber ku ew
rojekî mezin e, yê mîna wê nîne
û ew dema tengasiya Aqûp e; lê
belê dê ji wê xelas bibe! 8 Û dê
di wê rojê de wusa bibe ku, XU-
DANê artêşan dibêje, ez ê nîrê wî
ji histuyê te rahêlim û bişikînim û
ez ê qeydên te biqetînim û êdî dê
yên biyan wî ji xwe re nekin dîl;
9 lê belê dê ji Xwedayê xwe XU-
DAN re û ji qiralên xwe Dawidê
ku bona wan danîme re qûlitiyê
bikin. 10 Û ya qûlê min Aqûp,
tu metirse, XUDAN dibêje û ya
Îsraêl, tu nekeve bêzariyê! ji ber
ku a vay, ez ê te ji dûra û nîjada
te ji warên wanî sirgûniyê xelas
bikim û dê Aqûp şunda vegere û
dê rehet bike û bêxem be û dê yê
ku wî bitirsîne tune be! 11 Ji ber
ku bona te xelas bikim, XUDAN
dibêje; ez bi te re me; ji ber ku ez
ê hemûyên neteweyan ên ku te di
nav wan de belav kirime, bitûmî
bitûmî biqedînim[2], lê belê ez ê
te bitûmî bitûmî negihînim da-
wiyê; lê ez ê te bi dadiyê ve per-
werde bikim û ez ê te qet bêceza
nehêlim.
12 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Birîna te şîfa nabîne, kulên te jî
jan didin. 13 Kesê doza te bibî-
ne nîne ku, bila pêçînê li te bixin;
îlacên te yên ku şîfa bidin te nîne!
14 Hemû leyistokên te, te ji bîr ki-
rin; li te nagerin; ji ber ku, bona
mezintiya fesadiya te bi lêxistina
neyar ve, bi perwerde kirina bêîn-
saf li te xistim; ji ber ku sûcên te
zêde bûn! 15 Ma çima tu ji ber
birîna xwe feryadê dike? Jana te
şîfa nabîne; ji ber mezintiya fesa-

[1] Çewtiyê, an jî: Serhildanê.
[2] Bighêjînim dawiyê.

diya te van tiştan bi te kirim, ji ber
ku sûcên te zêde bûn! 16 Ji ber vê
yekê hemûyên ku te daqurtandine,
dê bên daqurtandin û hemûyên ku
tengasiyê didin te, dê pev re herin
sirgûnê û dê yên ku te talan kirine
bibin malê talanê û ez ê hemûyên
ku te tartale kirine bidim tartaleyê.
17 Ji ber ku ez ê te dîsa qenc bikim
û ez ê ji birînên te şîfayê bidim te,
XUDAN dibêje; ji ber ku bi go-
tina: Ew Siyon e, kesî ku lê digere
nîne! navê Sirgûnê li te kirin.
18 XUDAN wusa dibêje: A vay,
ez ê çadirên Aqûp ji sirgûnê
şunda bînim û ez ê heyfa xwe li
şunwarên wî ve bînim û dê ba-
jar li ser girikê xwe bête ava ki-
rin û dê li gor ûsilê li qesrê bête
rûniştin. 19 Û dê ji nav wan dengê
yên ku şikirî û şahiyê dikin, bi-
lind bibe û ez ê wan zêde bikim
û dê kêm nebin; ez ê mezintiyê
bi wan dim û dê biçûk nebin.
20 Û lawên wan mîna ku berê
çawa bin, dê wusa bin û dê civaka
wan li ber min bête zexim kirin û
ez ê sehêtiyê li hemûyên ku tenga-
siyê li wan dikin, bikim. 21 Û dê
serokê wan ji wan be û dê serwerê
wan ji hundirê wan ve derkeve û
ez ê wî nêzîk bikim û dê nêzîkî
min bibe; ji ber ma kî dikare ku
di biha canê xwe de nêzîkî min
bibe? XUDAN dibêje. 22 Û hûn ê
ji min re bibin netewe û ez ê ji we
re bibim Xwedê!
23 A vay, hêrsa XUDAN, bahoza
wî, bahoza ku dimale û dibe, der-
ket; dê bi serê xeraban ve biteqe!
24 Heta ku XUDAN mirazê dilê
xwe bike û heta ku tê de serfiraz
be, dê hêrsa wî ya sor şunda ve-
negere; hûn ê vê yekê di rojên
dawîn de fêhm bikin.

*Gelê Îsraêlê vedigere Welatê xwe*

31 Wê gavê ez ê bibim Xwe-
dayê hemûya eşîrên Îs-
raêlê, XUDAN dibêje û dê ew
ê bibin netewa min. 2 XUDAN
wusa dibêje: Netewa ku ji ber şûr
ve reviyaye û xelas bûye, Îsraêl,
dema ez bona ku aramiyê bidim
wê, herim li çolê xêrê[1] dît!
3 XUDAN ji dûr ve bi min re
xuyanî bû û got: Belê, bi hezkirina
abadîn ji te hez kirim; bo vê yekê
te bi dirûdiyê kişandim cem xwe.
4 Ez ê dîsa te ava bikim û tuyê
bête ava kirin, qîza Îsraêl ya ku
neçûye mêr! Dîsa tuyê bi defikan
xwe bixemilîne û tuyê bi alayi-
yên lîstikê yên ku şahiyê dikin ve
derkeve. 5 Tuyê dîsa li çiyayên
Samîriyê rezan biçikîne; yên
ku rez deynin, dê biçikînin û dê
mêwên wan tahm bikin. 6 Ji ber,
rojekî ku dê notirvanên te li ser çi-
yayên Efrayîmê bi gotina: Rabin
û em biçin Siyonê, cem Xwedayê
xwe XUDAN! bang bikin heye.

1 Lutif, say, qencî, an jî: Kerem.

7 Ji ber ku XUDAN wusa dibêje:
Bona Aqûp bi kêfxweşiyê bistirên
û bona yê ku ji neteweyan re serî
ye biqêrin! Bang bikin, hemd
bikin û bibêjin: Ya XUDAN, ne-
tewa xwe, maweya Îsraêlê xelas
bike! 8 A vay, ez ê wan ji warê ba-
kur ve bînim û ez ê wan ji nîçikên
dinê û tevî wan kor û kûd, pîreka
ducanî û pîreka ku diwelidîne pev
re bidim hev; dê wekî civakekî
mezin vegerin vê derê! 9 Dê bi
girî ve werin; her ku lava bikin,
ez ê rê nîşanî wan bidim; ez ê wan
li cem newalên avî ve, di rêya rast
ya ku tê de tilpekî nebin de bidim
meşandin; ji ber ku ez ji Îsraêlê
re Bav im, Efrayîm jî lawê minî
yekemîn e.
10 Ya neteweno, gotina XUDAN
guhdarî bikin û di giraveyên ku li
dûra ne de wê bigehînin û bibêjin:
Yê ku Îsraêlê belav kiriye, dê wê
bide hev û şivan keriyê xwe çawa
biparêze, dê bi vî awayî wê biparê-
ze. 11 Ji ber ku XUDAN Aqûp kir-
rî û wî ji destê yê ku jê xwurttir e
bi fîdyê xelas kir. 12 Û dê werin
û li cîhê bilind yê Siyonê dê bis-
tirên û dê berbi genim û xemra nû
û rûn, çêlikên mîh û dewaran ve,
dê berbi qenciya XUDAN ve bi-
herikin û dê canên wan bibe mîna
bexçeyê ku hatiye avdan û êdî dê
carekî din neçilmisin. 13 Wê gavê
xort û zilamên kalbûne pev re û
qîza ku neçûye mêr dê di alayiyên
lîstikan de kêfxweş bibe; ji ber ku
ez ê şîna wan vergerînim şahiyê û
ji ber keserên wan, ez ê xemrevî-
niyê li wan bikim û wan kêfxweş
bikim. 14 Û ez ê canên kahînan bi
rûn ve têr bikim û dê netewa min
bi qenciya min ve têr bibin, XU-
DAN dibêje.
15 XUDAN wusa dibêje: Li Ra-
mayê dengek tête bihîstin, fîxan û
giriyê bi êş, Rahêl bona zarokên
xwe di giriyê de; bona zarokên
xwe xemrevîniyê naxwaze, ji ber
ku ew nîn in! 16 XUDAN wusa
dibêje: Dengê xwe ji giriyê, çavê
xwe ji hêstir reşandinê ve şunda
bigirin! Ji ber ku bona karê te
mîşe heye, XUDAN dibêje û dê ji
warê neyar ve şunda werin. 17 Û
bona dawiya te[1] hêvî heye, XU-
DAN dibêje û dê lawên te vegerin
sînorên xwe! 18 Bi rastî, Efrayî-
ma ku li xwe dixe bihîstim: Te
min perwerde kir û ez mîna can-
geyê hînî nîrê xwe nebûye hatim
perwerde kirin; min vegerîne ku
vegerim; ji ber ku Xwedayê min
XUDAN tu yî! 19 Bi rastî, paşî
ku vegeriyam tobe kirim û paşî ku
hatim perwerde kirin li kemaxa
xwe xistim; ji ber ku şermezariya
ciwaniya xwe dikişînim şerm ki-
rim û rusway bûm! 20 Ma lawê
minî birûmet Efrayîm e? Ma za-
rokê xoşewîst ew e? Ji ber her

[1] An jî: Dahatûya te.

ku ez li dijî wî dibêjim bêsekin
ez wî di bîra xwe de tînim; dilê
min ji ber vê yekê bêriya wî dike;
bi rastî, ez ê dilovaniyê lê bikim!
XUDAN dibêje.
21 Ji xwe re nîşanên rê deyne, ji
xwe re sitûnan biçikîne; dilê xwe
bixe rêya mezin, rêya ku tuyê
here! Şunda vegere, qîza Îsraêlê
ya ku neçûye mêr, vegere van
bajarên xwe! 22 Ma tuyê heta çi
wextî beredayitiyê bike, ya qîza
ceban? Ji ber ku XUDAN li dinê
tiştekî nû afirand: Dê pîrek zilam
biparêze.
23 Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan, wusa dibêje: Dema ez
sirgûnên wan şunda bînim, dê
li warê Cihûdayê û di bajarên
wê de dîsa vê gotinê bibêjin: Ya
welatê dadiyê, ya çiyayê pîroziyê,
bila XUDAN te pîroz bike! 24 Û
Cihûda û hemû bajarên wê cotka-
ran û yên ku tevî keriyên xwe koç
kirine, dê li wir pev re rûnin. 25 Ji
ber ku ji canê westayî re têra wî
dam vexwartin û her canê çilmisî
têr kirim! 26 Li ser vêya hişyar
bûm û nihêrtim û xewa min ji min
re şêrîn hat.
27 A vay, XUDAN dibêje, rojên ku
ez ê mala Îsraêlê û mala Cihûdayê
bi tova mirov û bi tova heywên ve
biçînim tên. 28 Û dê wusa bibe,
çawa ku bona helkişandin û xera
kirin û qulupandin û tune kirin û
bona xistina asîwê notirvaniyê ki-
ribim, bona çikandin û avakirinê
jî ez ê li ser wan bi wî avayî no-
tirvaniyê bikim, XUDAN dibêje.
29 Di wan rojan de dê êdî: Bavan
hersimê xwarin û diranên lawan
sekihîn, nebêjin! 30 Lê belê dê
her kes bona fesadiya xwe bimi-
re; dê diranê her kesê ku hersimê
dixwe bona xwe besekihin!
31 A vay, XUDAN dibêje, rojên
ku ez ê bi mala Îsraêlê û bi mala
Cihûdayê re peymanekî nû bibi-
rim tên; 32 ne mîna peymana ku
roja bona bapîrên wan ji warê
Misirê derxînim bi destê wan ve
girtim bi wan re birrîme; çawa ku
ez efendiyê wan im, lê dîsa jî pey-
mana min xera kirin, XUDAN
dibêje. 33 Lê belê paşî wan rojan,
XUDAN dibêje, peymana ku ez
ê bi lawên Îsraêl re deynim ew e:
Ez ê zagona xwe deynim hundirê
wan û wê li ser dilên wan binivîsî-
nim û ez ê ji wan re bibim Xwedê
û dê ew ê ji min re bibin netewe.
34 Û êdî dê her kes ji birayê xwe
re û ji cîranê xwe re bi gotina: Bi
XUDAN ve bizanibin! nedin hîn
kirin; ji ber ku dê ji biçûkên wan
heta mezinên wan bi min bizani-
bin, XUDAN dibêje; ji ber ku ez
ê li fesadiyên wan biborînim û êdî
ez ê sûcên wan ne di bîra xwe de
bînim!
35 XUDANê ku bona bi rojê ro-
nahî be rojê daye, bona bi şevê
ronahî be zagona heyv û stêr-

kan daniye, heta ku şepêl bigur-
min behrê tevlihev dike, navê wî
XUDANê artêşan e wusa dibêje:
36 Ger van zagonan ji ber min
rabin, XUDAN dibêje, dê netewa
Îsraêlê jî di tûmiya rojan de li ber
min ji netewebûnê ve derkeve!
37 XUDAN wusa dibêje: Ger li
jor ezman bên pîvan û li jêr erd
bête kolan, wê gavê ez ê jî ji ber
hemû tiştên ku kirine, hemûya
nîjada Îsraêlê ji xwe ve bavêjim,
XUDAN dibêje.
38 A vay, rojên ku bajar ji qû-
leya Hananelê heta deriyê qun-
cikê bona XUDAN tête ava kirin
tên, XUDAN dibêje. 39 Û benê
pîvanê dê hîn jî bi wir ve, raste
rast derkeve çiyayê Garebê û bizi-
vire Goayê. 40 Û giştika çemê laş
û xweliyan û heta newala Kîdronê
hemûyên zeviyan, berbi rojhilatê
heta quncîka deriyê hespan, dê ji
XUDAN re pîroz bibe; dê ji cîhê
xwe ve neyê rakirin û dê abadîn
xera nebe.

*Yêremya Zeviyê distîne*

32 Di sala dehemîn ya Tse-
dekiyayê qiralê Cihûdayê
de, ev hîjdeh saliya Nebûkadnet-
sar bû gotina ku ji XUDAN ve
hatiye Yêremya ye. 2 Û wê gavê
artêşa qiralê Babîlê dor û berên
Orşelîmê digirtin û peyxamber
Yêremya li hewşa parêzgeran
di qesra qiralê Cihûdayê de girtî
bû. 3 Ji ber ku qiralê Cihûdayê
Tsedekiya: Ma çima tu bi gotina:
XUDAN wusa got: A vay, ez ê vî
bajarî bidim destê qiralê Babîlê
û dê wê bistîne 4 û dê Tsedeki-
yayê qiralê Cihûdayê nikaribe ji
destê Kildaniyan bireve û xelas
bibe, lê belê dê muheqeq bi destê
qiralê Babîlê ve bide dayîn û dê
dev bi devî pê re biaxife û dê ça-
vên wî çavên wî bibînin 5 û ew
ê, Tsedekiya bibe Babîlê û heta
ku ez sehêtiyê lê bikim, dê li wir
bimîne, XUDAN dibêje; gotina:
Ma çima te bi gotina: Ger hûn bi
Kildaniyan re cengê bikin jî dê
karên we qenc neçe peyxamberti-
yê dike? gotibû û wî hepis kiribû.
6 Û Yêremya got: Vê gotina XU-
DAN ji min re hat: 7 A vay, dê
Hanamelê lawê apê te Şallûm
were û ji te re bibêje: Zeviya min
ya ku li Anatotê ye, ji xwe re bis-
tîne; ji ber ku bona stendina wê
heqê mervatiyê yê te ye! 8 Û lawê
apê min Hanamel, li gor gotina
XUDAN hate hewşa parêzgeran,
cem min û ji min re got: Ez rica
dikim, zeviya min ya li Anatota
ku li warê Benyamîn e bistîne;
ji ber ku heqê mêrasê yê te ye û
heqê mervatiyê yê te ye; ji xwe
re bistîne. Û pê hîn bûm ku[1] ev
gotina XUDAN bû. 9 Û zeviya
ku li Anatotê bû ji lawê apê xwe

[1] An jî: fêhm kirim ku.

Hanamel stendim û zîv jê re we-
zinandim, hivdeh şekel[1] zîv. 10 Û
pelikê destxet kirim û mohr kirim
û bangî şahdeyan kirim û zîvê
jê re di tereziyê de wezinandim.
11 Û pelika firotinê, ya li gor
zagon û kevneşopê hatiye mohr
kirin û ya ku vekirî ye rahiştim
12 û li pêş çavê lawê apê xwe
Hanamel û li pêş çavên şahdeyên
ku peyta[2] firotina destxetî kirine
û li pêş çavên hemû Cihûdên ku
li hewşa parêzgeran rûniştine,
peyta firotinê dam Barûkê lawê
Neriyayê lawê Mahseya. 13 Û li
ber çavên wan emir dam Barûk û
gotim: 14 Xwedayê Îsraêlê XU-
DANê artêşan wusa dibêje: Van
pelikan rahêle, vê pelika firotinê
ya hatiye mohr kirin û vê pelika
vekirî rahêle û wan têxe feraxekî
axîn ku bila demekî dirêj bimînin!
15 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê,
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Dê li vî welatî dîsa xaniyan û ze-
viyan û rezan bêne stendin!
16 Û paşî ku pelika firotinê dam
Barûkê lawê Neriya ji XUDAN
re dua kirim û gotim: 17 Ax, ya
Xudan, XUDAN! A vay, te ezma-
nan û erdê bi hêza xwe yî mezin
û bi bazûya xwe yî dirêj kirî ve
afirand; bona te tiştekî ku neyê
çêkirin nîne, 18 tu ku, ji hezaran
mirovan re dilovaniyê dikî û paşî
bavan, tu fesadiyên wan bi sîngên
lawên wan ve dide: Tu Xwedayê
mezin û bi qudret î, navê te XU-
DANê artêşa ye; 19 tu di şîretê de
mezin û di kar de xwurt î; tu ku,
bona ji her kesî re li gor rêyên wan
û bona hilberê karên wan bide, ça-
vên te li ser hemû rêyên mirovan
vekirîne; 20 te ku, li warê Misirê
û li Îsraêlê û di nav mirovên wekî
din de heta îroj nîşan û nuwaze-
yan çêkir û mîna ku îroj e te ji
xwe re nav çêkir 21 û bi nîşanan û
bi nuwazeyan û bi destekî xwurt
û bi bazûya dirêjkirî û bi sawêrekî
mezin te netewa xwe Îsraêlê ji
Misirê derxist 22 û vî warê ku
te bona dayînê ji bapîrên wan re
sond xwaribû, vî warê ku jê şîr û
hungiv diherike te da wan 23 û
hatin û wê ji xwe re kirin milk; lê
belê gotina te guhdarî nekirin û di
zagona te de nemeşiyan; tu tiştên
ku te bona kirina wan emir dayîbû
wan nekirin û te hemûya vê asîwê
anîn serê wan. 24 A vay, bona ku
bajar bistînin meterîs gîhaştin wê
û bajar ji ber şûr û xela û webayê
bi destê Kildaniyên ku li dijî wan
cengê dikin ve hate dayîn û tiştê
ku te digot bû û a vay, tu dibînî.
25 Û ya Xudan, XUDAN, te ji min
re: Zeviyê bi zîv bistîne û bangî
şahdeyan bike, got; bajar jî bi
destê Kildaniyan ve hate dayîn!

1 Li rasteka menan binêrin.

2 Dokuman, belge; an jî: Nameya firotinê.

26 Û vê gotina XUDAN ji Yêrem-
ya re hat: 27 A vay, Xwedayê
hemû mirovan XUDAN ez im;
ma bona min tiştekî ku neyê kirin
heye? 28 Ji ber vê yekê XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê vî bajarî
bidim destê Kildaniyan û Nebû-
kadnetsarê qiralê Babîlê û dê wê
bistîne 29 û dê Kildaniyên ku li
dijî vî bajarî cengê dikin werin û
dê agir bi vî bajarî bixin û dê wê û
xaniyên ku bona min hêrs bikin li
ser ji Baal re buxurê vêdixistin û
ji îlahên wekî din re pêşkêşiya ri-
jandinê dirijandin, dê bişewitînin.
30 Ji ber ku ji zarokantiya xwe ve
lawên Îsraêl û lawên Cihûda tenê
ya ku di çavê min de xerab e çê-
kirin; ji ber ku lawên Îsraêl xeynî
bi karên destê xwe ve min hêrs
bikin tu tiştî nekirin, XUDAN
dibêje. 31 Ji ber ku lawên Îsraêl
û lawên Cihûdayê, tevî qiralên
xwe, serokên xwe û kahîn û pey-
xamberên xwe û mêrên Cihûdayê
û yên ku li Orşelîmê rûdinin, wan
ji her xerabiya ku bona min hêrs
bikin dikirin, bona ku wê ji ber
çavê xwe rakim û bavêjim, 32 ev
bajar, ji roja ku wê ava kirine heta
îroj bû sedema hêrs û xezeba min.
33 Û ji min re ne wec, lê belê paş
zivirandin û çawa ku lez kirim û
bi hîn kirinê hînî wan kiribim jî,
dîsa jî bona fêrbûnê guhdarî ne-
kirin. 34 Lê belê bona mala ku bi
navê min ve tête bang kirin, min-
dar bikin tiştên xwe yî sik xistin
wê. 35 Û ji bo ku bona Molek
law û qîzên xwe ji agir ve derbas
bikin, cîhên bilind ên Baal, yên ku
li newala lawê Hînnom ava kirin;
min emrê van tiştan neda wan û ji
bo bi Cihûda re sûcê bidin kirin
bona vî tiştê mekrûh çêbikin di
hişê min de derbas nebû.
36 Û niha ji ber vê yekê Xwedayê
Îsraêlê XUDAN bona vî bajarê
ku hûn dibêjin: Bi şûr û xelayê
û bi webayê dane destê qiralê
Babîlê, wusa dibêje: 37 A vay, ez
ê wan ji hemû welatên ku, min
bi hêrsa xwe û xezeba xwe û bi
xeydekî mezin wan ajotibûm, wan
bidim hev û ez ê wan şunda bînim
vê derê û ez ê wan di ewledariyê
de bidim rûniştin. 38 Û dê ew ê ji
min re bibin netewe û ez ê ji wan
re bibim Xwedê 39 û bona ku di
hemûya rojan de ji min bitirsin,
ez ê jî bona ji wan re û bona paşî
wan ji lawên wan re bibe qencî
tenê dilekî û rêyekî bidim wan
40 û bona ku bi wan re qenciyê
bikim wekî ku ez ê ji paş wan ve-
negerim, ez ê bi wan re peymana
abadîn deynim û bona ku ji min
venegerin, ez ê tirsa xwe têxim
dilên wan. 41 Û ez ê ji wan re bi
qencî kirinê, bona wan şa bibim û
bi rastiyê, bi hemûya dilê xwe û
bi hemûya canê xwe ez ê wan li
vî welatî biçikînim. 42 Ji ber ku
XUDAN wusa dibêje: Çawa ku

hemûya vê xerabiyê anîbim ser vî
welatî, hemû qenciya ku ji wan re
gotibûm jî bi vî awayî bînim ser
wan. 43 Û dê li vî welatê ku we:
Bû çolekî bê mirov û bê heywan,
bi destê Kildaniyan ve hate dayîn
digotin, zevî bêne stendin. 44 Dê
li warê Benyamînê û li cîhên ku
li dora Orşelîmê ye û li bajarên
Cihûdayê û li bajarên çiyayiyê de
û li bajarên Şefelayê û li bajarên
başûr, dê bi zîvê zeviyan bistînin
û pelikan destxetî bikin û dê mohr
bikin û bangî şahdeyan bikin, ji
ber ku ez ê sirgûnên wan şunda
bînim! XUDAN dibêje.

*Hêviya ji nû ve xwe berhev kirinê*
Amos 9,11-15

33 Û hîn Yêremya di hewşa
parêzgeran de girtî bû,
cara duwemîn ji wî re vê gotina
XUDAN hat: 2 XUDANê ku wê
çêkiriye û XUDANê ku bona wê
bizexmîne şikil dayiyê, Yê ku
navê wî XUDAN e wusa dibêje:
3 Bangî min bike ku ez bersivê bi-
dim te û tiştên ku tu bi wan nizane
û nikare bigihêje wan, ez nîşanî te
bidim. 4 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê
XUDAN; bona xaniyên vî bajarî
ên ku ji ber ji meterîs û şûran re
bibe stare xerabûne û bona xani-
yên qiralê Cihûdayê, wusa dibêje:
5 Bona ku li dijî Kildaniyan cengê
bikin û wan xaniyan bi laşên mi-
rovên ku di hêrs û xeyda xwe de
li wan xistime tijî bikin tên, ew
mirovên ku, ji ber hemû xerabiyên
wan wecê xwe li hemberî vî bajarî
veşêrtim. 6 A vay, ez ê tenduristî û
şîfa bidim wî bajarî û ez ê wan baş
bikim û ez ê zêdeyiya aştî û raste-
qîniyê nîşanî wan bidim. 7 Û ez ê
sirgûnên Cihûdayê û sirgûnên Îs-
raêlê şunda bînim û mîna ku berê
ez ê wan dîsa ava bikim. 8 Û ji ber
hemû fesadiya ku li dijî min kiri-
ne, ez ê wan paqij bikim û hemû
fesadiyên wan ên ku li dijî min sûc
kirine û li dijî min guneh kirine ez
ê li wan biborînim. 9 Li ber hemû
neteweyên dinê ên ku hemû qenci-
ya ku ez ê bi wan bikim bibihîzin
û ji ber hemû qencî û xweşiya ku
ez ji wan re dikim dê bêzar bibin
û bilerizin, dê ev bajar bona min
navekî kêfxweşî kirinê, şikirî û
mezintî bibe.
10 XUDAN wusa dibêje: Li vî
cîhê ku hûn dibêjin bê mirov û
heywan xalî[1] maye, li bajarên
Cihûda û kuçeyên Orşelîmê yên
tu kesê ku tê de rûnê nemaye
û bê mirov û bê heywan hatine
çol kirin, 11 dê dengê şabûnê û
dengê kêfxweşiyê, dengê zava û
dengê bûkê, dengê yên ku: Ji XU-
DANê artêşan re şikiryê bikin,
ji ber ku XUDAN qenc e, ji ber
ku bexşandina wî abadîn e! û dê
dengê yên ku pêşkêşiyên şikiryê

*1* An ji: Tenha.

tînin mala XUDAN dîsa bên
bihîstin. Ji ber ku mîna berê, ez ê
sirgûnên welêt şunda bînim, XU-
DAN dibêje.
12 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Li vî cîhê ku bê mirov û bê hey-
wan xalî maye û li hemû bajarên
wê, dîsa dê welatê şivanên ku
keriyên xwe mexel tînin bibe.
13 Li bajarên çiyayiyê, li bajarên
Şefelayê û li bajarên Başûrê û li
warê Benyamîn û li cîhên ku li dora
Orşelîmê ne û li bajarên Cihûdayê
dê dîsa ji destê jimartvan ve kerî
derbas bibin, XUDAN dibêje.
14 A vay, XUDAN dibêje, rojên
ku ez ê gotina qenc ya bona mala
Îsraêlê û bona mala Cihûdayê bî-
nim cîh tên. 15 Di wan rojan de û
di wê wextê de, ez ê bona Dawid
Ajdanekê Rehê yê salih bajom
û dê li welêt dadî û rastiyê bike.
16 Di wan rojan de dê Cihûda xe-
las bibe û dê Orşelîm di ewlekari-
yê de rûnê û dê ew bajar bi vî navî
ve betê bang kirin: XUDAN rasti-
ya me ye! 17 Ji ber ku XUDAN
wusa dibêje: Bona Dawid dê li ser
texta mala Îsraêlê ve zilamê ku
rûnê, dê kêm nebe 18 û dê kahîn-
an, zilamê ku bona Lêwiyiyan li
ber min pêşkêşiyên şewitandinê
pêşkêş bike û pêşkêşiyên nan
bişewitîne û her tim qurbanê serjê
bike, dê kêm nebin.
19 Û vê gotina XUDAN ji Yêrem-
ya re hat: 20 XUDAN wusa dibêje:
Bona ku roj û şev ne di wextê xwe
de bin, ger hûn bikaribin bi rojê
peymana min û şevê peymana
min xera bikin; 21 wê gavê bona
li ser texta wî lawekî wî yê qirale-
tiyê bike tune be, peymana ku bi
qûlê xwe Dawid re danîme û pey-
mana min ya bi xizmetkarê min
Lêwiyiyan, kahînan re ye jî dibe
ku xera bibe. 22 Çawa ku artêşa
ezmanan neyê jimartin û qûma
behrê neyê pîvandin, ez ê nîjada
qûlê xwe Dawid û Lêwiyiyên ku
ji min re xizmetê bikin jî wusa
zêde bikim.
23 Û vê gotina XUDAN ji
Yêremya re hat: 24 Ma tu nabî-
ne, ev netewe bi gotina: XUDAN
du eşîrên ku hilbijartiye ji xwe re
avêt çawa dibêjin? Netewa min
li hemberî xwe wekî gelekî na-
hesibînin û bi vî awayî wê biçûk
dibînin. 25 XUDAN wusa dibêje:
Ger peymana xwe yî roj û şevê,
zagonên ezmanan û erdê ez bi
xwe danenîbim; 26 wê gavê bona
ku li ser nîjada Birahîm, Îshaq û
Aqûp serweriyê bike ez ji nîja-
da wî ve ranehêlim, ez ê nîjada
Aqûp û qûlê xwe Dawid jî ji xwe
bavêjim; ji ber ku ez ê sirgûnên
wan şunda bînim û ez ê dilovani-
yê li wan bikim!

*Qiral Tsedekiya tête îkazkirin*

34 Dema qiralê Babîlê Nebû-
kadnetsar û hemû artêşa

wî û hemû welatên dinê û hemû
neteweyên ku di bin serweri-
ya wî de ne, li dijî Orşelîmê û li
dijî hemû bajarên wê cengê di-
kirin, ji XUDAN ve ev gotin ji
Yêremya re hat: 2 Xwedayê Îs-
raêlê XUDAN wusa dibêje: Here
û bi qiralê Cihûdayê Tsedekiya re
biaxife û jê re bibêje: XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê vî bajarî
bidim destê qiralê Babîlê û dê wê
bişewitîne 3 û tuyê ji destê wî ve
nereve û xelas nebe, lê belê mu-
heqeq tuyê bê girtin û bi destê wî
ve bête dayîn û dê çavên te çavên
qiralê Babîlê bibînin û dê dev
bi devî hevpeyvînê bi te re bike
û tuyê here Babîlê! 4 Lê, ya qi-
ralê Cihûdayê Tsedekiya, gotina
XUDAN guhdarî bike! XUDAN
bona te wusa dibêje: Tuyê bi şûr
ve nemire; 5 tuyê di xweşiyê de
bimire û mîna bona bapîrên te û
qiralên kevin yên ku berî te ne
tutsiyê vêxistine, dê bona te jî
bişewitînin û dê bona te, bi go-
tina: Ax, efendî! li xwe bixin; ji
ber ku min gotinê got, XUDAN
dibêje.
6 Û peyxamber Yêremya
hemûyên van gotinan li Orşelîmê
ji Tsedekiyayê qiralê Cihûdayê re
got 7 û artêşa qiralê Babîlê li dijî
Orşelîmê û li dijî hemû bajarên
Cihûdayê ku li pêy mayînê, li dijî
Lakîşê û Azekayê di ceng kirinê
de bû; ji ber ku ji nav bajarên
Cihûdayê mîna bajarên bi dîwar
tenê vana mabûn.

*Ji Dîlan re Azadî*

8 Paşî ku qiral Tsedekiya bona a-
zadbûnê bang bike bi hemû nete-
wa ku li Orşelîmê ne, 9 bi gotina:
Bila her kes dîlê xwe û her kes
cariya xwe, mêr û jinê ku Îbranî
ye, serbest berdin û bila tu kes ji
wan birayê xwe yî Cihûd neke dîl,
peymanê danî ji XUDAN ve go-
tin hat ji Yêremya re. 10 Û hemû
serokan û hemû netewe ên ku bi
gotina: Bila her kes dîlê xwe û
her kes cariya xwe serbest berdin
û bila êdî tu kes ji wan nekin dîl,
ketine peymanê guhdarî kirin û
guhdarî kirin û wan azad berdan;
11 lê belê dawiyê zivirîn û dîl û
cariyên ku serbest berdabûn şunda
zivirandin û wan bi zorê kirin dîl
û cariye.
12 Û ji XUDAN ve ev gotina XU-
DAN ji Yêremya re hat: 13 Xwe-
dayê Îsraêlê XUDAN wusa dibêje:
Roja ku min bapîrên we ji warê
Misirê, ji mala dîlitiyê derxist, bi
wan re peymanê birrîm û gotim:
14 Her yekê we, hûn ê birayê xwe
yî Îbranî yê ku jê re hatiye firotin
û heft salî qûlitiyê jê re kiriye, di
dawiya heft salî de azad berdin û
tuyê ji cem xwe wî serbest berde;
lê belê bapîrên we min guhdarî ne-
kirin û guh nedan min. 15 Û niha
çawa ku her kes ji cîranê xwe re

azadiyê bang kiribû hûn vegeri-
yabûn û we ya ku di çavê min de
rast e kiribûn û we li ber min, li
mala ku bi navê min ve tête bang
kirin peymanê danîbûn; 16 lê belê
hûn şunda vegeriyan û navê min
gemarî kirin û dîlên her kesî û ca-
riyên her kesî yên ku li gor xwesti-
na xwe, we azad berdabûn şunda
dan vegerandin û we bi zorê wan
ji xwe re kirin dîl û cariye.
17 Ji ber vê yekê XUDAN wusa
dibêje: Çawa ku bona her kes ji bi-
rayê xwe re û her kes ji cîranê xwe
re banga azadiyê bikin, we min
guhdarî nekirin; a vay, bona we ez
ê ji şûr re, ji webayê re û ji xelayê
re banga azadiyê bikim û bona ku
hûn di nav hemû welatên dinê de
bi vir ve û bi wir ve bên avêtin, ez
ê we bidim dest. 18 Û ez ê zilamên
ku golik kirine du parî û ji nav pa-
riyên wê ve derbas bûn, peymana
ku li ber min birrîn nezeximandin
û ji peymana min wêdetir derbas
bûn 19 û serokên Cihûdayê û be-
gên Orşelîmê, karmendên serayê
û kahînan û hemû neteweya ku ji
nav pariyên golikê ve derbas bûne
ez ê bidim dest; 20 ez ê wan bidim
destê neyarên wan û destê yên ku li
canên wan digerin û dê laşên wan
ji cenawirên erdê re û ji civîkên
ezmanan re bibin xwarin. 21 Û ez
ê Tsedekiyayê qiralê Cihûdayê û
serokên wan bidim destê neyarên
wan û destê yên ku li canên wan
digerin û destê artêşa qiralê Babîlê
ya ku ji ser we vekişiyane. 22 A
vay, ez ê emir bidim, XUDAN
dibêje û ez ê wan şunda bînim vî
bajarî û dê li dijî wê cengê bikin û
dê wê bistînin û dê wê bişewitînin
û ez ê bajarên Cihûdayê þikim
wêraneyek tu kes tê de rûnanê!

*Mînaka Dilsoziya Rekabiyan*

35 Di rojên Yehoyakîmê lawê
Yoşiyayê qiralê Cihû-
dayê de ji XUDAN ve ev gotin ji
Yêremya re hat: 2 Here mala Re-
kabiyan û ji wan re bibêje û wan
bîne mala XUDAN, ji odeyan
odeyekê û xemrê bi wan ve bide
vexwarin! 3 Û Yaazanyayê lawê
Yêremyayê lawê Habatsînya û bi-
rayên wî û hemû lawên wî û giştika
mala Rekabiyan girtim 4 û wan
anîm mala XUDAN, odeya lawên
Hananyayê lawê Îgdalyayê zilamê
Xwedê û ew odeya li kêleka odeya
serokan ya li ser odeya notirvanê
şêmûgê Maaseyayê lawê Şallûm
bû. 5 Û tas û feraxên bi xemrê
ve tijî ne danîm ber lawên mala
Rekabiyan û ji wan re: Xemrê ve-
xwin! gotim. 6 Û gotin: Em xem-
rê venaxwin; ji ber ku bapîrê me
Yonadabê lawê Rekab emir daye
me û gotiye: Hûn û lawên we heta
abadînê hûn ê xemrê venexwin
7 û hûn ê xanî ava nekin û tovê
neçînin û rez neçikînin û dê ev di
we de tunebin; lê belê bona hûn li

warê ku lê mêhvan in zehf bijîn di
hemû rojên xwe de hûn ê di çadirê
de rûnin! 8 Û em, jinên me, lawên
me û qîzên me, em bona ku xemrê
venexwin 9 û bona rûniştinê xani-
yan ava nekin, li gor her tiştên ku
ji me re emir dayîne, gotina bapîrê
xwe Yonadabê lawê Rekab guh-
darî kirin û rezê me û zeviya me
û zadê me nîne 10 û em di çadiran
de rûniştin û bapîrê xwe Yonadab
guhdarî kirin û li gor her tiştê ku
ji me re emir dayîne kirin. 11 Lê
belê wusa bû ku, dema Nebû-
kadnetsarê qiralê Babîlê hilkişiya
welêt, me got: Werin û em ji ber
artêşa Kildaniyan û ji ber artêşa
Sûriyeyiyan bikevin Orşelîmê! Û
bi vî awayî em niha di Orşelîmê
de rûdinin.
12 Û vê gotina XUDAN ji
Yêremya re hat: 13 Xwedayê
Îsraêlê, XUDANê artêşan wusa
dibêje: Here û ji mêrên Cihûdayê
re û ji yên ku li Orşelîmê rûdinin
re bibêje: Ma bona ku gotinên min
guhdarî bikin qey hûn ê qet fêr
nebin? XUDAN dibêje. 14 Bi go-
tina Yonadabê lawê Rekab; ya ku
ji lawên xwe re gotibû bila xem-
rê venexwin girtin û heta îrojê
venaxwin, ji ber ku bi emrê
bapîrên xwe ve digirin. Lê belê
bi lezî kirin û gotinê min ji we re
gotin û we min guhdarî nekirin!
15 Û bi lezî kirim û ji we re şandim
û bo gotina: Niha bila her kes ji
rêya xwe yî xerab vegerin û karên
xwe baş bikin û bona ji îlahên
wekî din re qûlitiyê bikin, li pêy
wan nemeşin û hûn ê li warê ku
dayîme we û bapîrên we, rûnin,
bi hemû qûlên xwe yî peyxamber
ji we re şandim! Lê belê we guh
nedanê û min guhdarî nekirin.
16 Madem ku lawên Yonadabê
lawê Rekab, bi emrê ku bapîrên
wan dabûn wan girtin û vê ne-
teweya min guhdarî nekirin;
17 ji ber vê yekê Xwedayê Îsraêlê
Xwedayê artêşan XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê hemû xera-
biya ku li dijî Cihûdayê û li dijî
hemûyên ku li Orşelîmê rûdinin
re gotime, bişînim ser wan; ji ber
ku ji wan re gotim û guhdarî ne-
kirin û bangî wan kirim û bersivê
nedan!
18 Û Yêremya ji mala Reka-
biyan re got: Xwedayê Îsraêlê,
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Madem ku we emrê bapîrê xwe
Yonadab guhdarî kirin, li gor her
tiştê ku ji we re emir dayîne kirin;
19 ji ber vê yekê Xwedayê Îsraêlê
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Di tûmiya rojê de, zilamekî Yo-
nadabê lawê Rekab dê li ber min
kêm nebe!

*Qiral Yehoyakîm Tomarê dişewitîne*

36 Û wusa bû ku, di sala ça-
remîn ya Yehoyakîmê lawê
Yoşiyayê qiralê Cihûdayê de ji

XUDAN ve ev gotin ji Yêremya
re hat: 2 Bona xwe balorekî pir-
tûkê rahêle û ji rojên Yoşiya ve, ji
rojên ku ji te re gotime heta îroj,
hemû gotinên li dijî Îsraêlê û li dijî
Cihûda û li dijî hemû neteweyan
ji te re gotime li wê binivîsîne! 3
Dibe ku mala Cihûda, bi hemû xe-
rabiya ku bona her kes ji rêya xwe
yî xerab vegerin bînim serê wan
difikirim, bibihîzin û ez jî fesadî û
sûcên wan biborînim[1]!
4 Wê gavê Yêremya bangî Barûkê
lawê Neriya kir û Barûk, hemû
gotinên ku XUDAN ji Yêremya
re gotiye, ji devê wî ve li balora
pirtûkê nivîsandin. 5 Û Yêremya
emir da Barûk û got: Ez girêdayî
me, nikarim bikevim mala XU-
DAN; 6 lê belê tu here û gotinên
XUDAN, ên ku te ji devê min ve
nivîsandine, roja rojiyê, gava ne-
tewe bibihîzin li mala XUDAN ji
balorê ve bixwîne û dema hemû
Cihûdên ku ji bajarê xwe ve hati-
ne bibihîzin jî tuyê wan bixwîne!
7 Dibe ku lavayên xwe li ber XU-
DAN pêşkêş bikin û her kes ji rêya
xwe yî xerab vegerin; ji ber hêrs û
xeyda ku XUDAN li dijî vê nete-
weyê gotiye, mezin e! 8 Û Barûkê
lawê Neriya, di mala XUDAN de
ji pirtûkê gotinên XUDAN xwend
û bi vî awayî, li gor her tiştên ku
Yêremya emir dabûnê kir.

[1] Bibexşînim.

9 Û wusa bû ku, di sala pêncan ya
Yehoyakîmê lawê Yoşiyayê qiralê
Cihûdayê de, di meha nehan de
hemû netewa ku li Orşelîmê ne û
hemû netewa ku ji bajarên Cihû-
dayê hatine Orşelîmê, li ber XU-
DAN banga rojiyê kirin. 10 Û li
mala XUDAN, di odeya Gemar-
yayê lawê Şafanê nivîskar de, li
hewşa jorîn, li cîhê ketina deriyê
nû ya mala XUDAN, Barûk dema
hemûya netewê dibihîst gotinên
Yêremya ji pirtûkê ve xwend.
11 Û Mîkayayê lawê Gemaryayê
lawê Şafan dema ji pirtûkê hemû
gotinên XUDAN bihîst, 12 daket
mala qiral, odeya nivîskar û a vay,
hemûyên serokan, nivîskar Elîşama
û Delayayê lawê Şemaya û El-
natanê lawê Akbor û Gemaryayê
lawê Şafan û Tsedekiyayê lawê
Hananya û hemûyên began li wir
bûn. 13 Û Mîkaya, hemû gotinên
ku Barûk dema netewe guhdarî di-
kirin ji pirtûkê ve dixwend bihîs-
tibû, ji wan re gîhand. 14 Û hemû
serokan bi gotina: Balora ku dema
netewe guhdarî dikirin, te xwend
rahêle destê xwe û bîne! Yehûdiyê
lawê Netanyanê, lawê Şelemyayê,
lawê Kûşî ji Barûk re şandin. Û
Barûkê lawê Neriya balor hilgirt
destê xwe û hate cem wan. 15 Û jê
re: Niha rûne û em ê guhdarî bikin
û tu wê bixwîne, gotin. Û dema
wan guhdarî dikirin Barûk xwend.
16 Û wusa bû ku, dema wan hemû

van gotinan bihîstin bi bêzarî ve-
geriyan hev û ji Barûk re gotin:
Muheqeq em ê hemû van gotinan
bigihînin qiral. 17 Û ji Barûk re
pirsîn û gotin: Niha ji me re bi-
bêje; te hemû van gotinan çawa ji
devê wî ve nivîsand? 18 Û Barûk
ji wan re got: Hemû van gotinan bi
devê xwe ve ji min re got, min jî bi
hibrê li pirtûkê nivîsand! 19 Û se-
rokan ji Barûk re gotin: Here, tu jî,
Yêremya jî xwe veşêrin û bila tu
kes nizanibin ku hûn li ku derê ne!
20 Û ketin hewşê, cem qiral
û balorê di odeya Elîşama de
veşartibûn û dema qiral guhdarî
dikir, hemû gotinan ragihandin.
21 Û bona balorê rahêle û bîne
qiral Yehûdî şand û ji odeya ni-
vîskar Elîşama wê rahişt û anî. Û
dema qiral guhdarî dikir û hemû
serokên ku li cem qiral guhdarî
dikirin Yehûdî wê xwend. 22 Û
meha nehemîn bû; qiral di mala
zivistanê de rûdinişt û li ber wî
manqela vêxistî hebû. 23 Û wusa
bû ku, Yehûdî her ku sê çar rûpel
dixwend, qiral bi pênûstiraşkê wê
jêkir û avêt agirê ku di manqelê
de ye, heta wê wexta ku, hemûya
balorê di agirê manqelê de qediya.
24 Û qiralê ku hemû van gotinan
guhdarî kir û hemû qûlên wî bêzar
nebûn û kincên xwe neçirandin.
25 Û her çiqas Elnatan û Dela-
ya û Gemarya, bona ku balorê
neşewitîne li ber qiral geriyabin
jî, wan guhdarî nekir. 26 Û bon
ku bi nivîskar Barûk û bi peyxam
ber Yêremya bigirin, qiral emir
Yerahmeelê lawê qiral û Seraya
yê lawê Azrîêl û Şelemyayê law
Abdeel kir; lê belê XUDAN wa
veşart.
27 Û paşî ku qiral balor û go
tinên ku Barûk ji devê Yêrem
ya nivîsandiye şewitand, vê go
tina XUDAN ji Yêremya re hat
28 Dîsa ji xwe re balorekî di
rahêle û hemû gotinên berê ê
ku di tomara yekemîn de ya k
Yehoyakîmê qiralê cihûday
şewitandiye bûn, li wê binivîse
29 Û tuyê bona Yehoyakîmê qi
ralê Cihûdayê wusa bibêje: XU
DAN wusa dibêje: Te bi gotina
Çima te bi gotina, bi rastî, dê qi
ralê Babîlê were û dê welêt xer
bike û dê di wê de mirov û hey
wan paqij bikin û bavêjin lê ni
vîsand? wê tomarê şewitand. 3
Ji ber vê yekê bona qiralê Cihû
dayê Yehoyakîm, XUDAN wus
dibêje: Dê tu kesê wî yê ku li se
texta Dawid rûnê tune be û d
laşê wî ji germiya rojê û ji sayiy
şevê re bête avêtin. 31 Û ez ê j
ber fesadiyên wan sehêtiyê li w
û li nîjada wî û li qûlên wî bikin
û hemû xerabiya ku li dijî wa
gotime û guh nedane, ez ê bînin
ser wan û ser yên ku li Orşelîm
rûdinin û li ser zilamên Cihûday
ve bînim!

32 Û Yêremya balorekî wekî din
rahişt û wê da nivîskar Barûkê
lawê Neriya û hemû gotinên pir-
tûka ku qiral Yehoyakîm di agir
de şewitandiye, ji devê Yêremya
lê nivîsandin û hîn pirr gotinên
din ên ku wek wan in bi ser van
gotinan ve hatin xistin.

*Yêremya di Girtîgehê de*

37 Û Tsedekiyayê lawê Yoşiya
ê ku qiralê Babîlê Nebû-
kadnetsar wî ji warê Cihûdayê
re kiribû qiral, li dêvila Konyayê
lawê Yehoyakîm qiraletiyê kir. 2
Lê belê gotinên ku XUDAN bi
navdîtiya Yêremya peyxamber
gotiye, ew bi xwe jî, qûlên wî jî,
netewa welêt jî guhdarî nekirin.
3 Û qiral Tsedekiya, bi gotina:
Niha bona me ji Xwedayê me
XUDAN re duê bike, Yehûkalê
lawê Şelemya û kahîn Tsefanyayê
lawê Maaseya ji peyxamber
Yêremya re şandin. 4 Û Yêrem-
ya di nav netewê de digeriya[1]; ji
ber ku wî nexistibûn girtîgehê.
5 Û artêşa Fîrawûn ji Misirê ve
derketibû û Kildaniyên ku dor û
berên Orşelîmê girtibûn, dema
agahiya wan bihîstin ji Orşelîmê
vekişiyan.
6 Û vê gotina XUDAN ji peyxam-
ber Yêremya re hat: 7 Xwedayê Îs-
raêlê XUDAN wusa dibêje: Ji qiralê
Cihûdayê re ê ku bona ji min bipir-
se, we ji min re şandiye, hûn ê wusa
bibêjin: A vay, dê artêşa Fîrawûn,
bona alîkariya we derketiye vegere
welatê xwe, Misirê. 8 Û dê Kildanî
dîsa werin û dê li dijî vî bajarî cengê
bikin û dê wê bigirin û bişewitînin.
9 XUDAN wusa dibêje: Bi go-
tina: Dê muheqeq Kildanî ji ser
me ve herin, xwe nexapînin; ji ber
ku dê nerin! 10 Ji ber ku, ger hûn
li giştika artêşa Kildaniyan ya ku
li dijî we cengê dikin, bixin û di
nav wan de tenê zilamên birîndar
bimînin jî, dê dîsa her yek di çadira
xwe de rabin ser pêlan û dê vî ba-
jarî bişewitînin!
11 Û wusa bû ku, gava ji ber artêşa
Fîrawûn artêşa Kildaniyan ji
Orşelîmê vekişiyan, 12 Yêremya
bona here warê Benyamîn û di
nav netewê de para xwe bistîne, ji
Orşelîmê derket. 13 Û ew di deriyê
Benyamîn de bû û serê notirvanan
li wir bû û navê wî Îriyayê lawê
Şelemyayê, lawê Hananya bû û bi
Yêremya peyxamber ve girt û got:
Tu derbasî Kildaniyan dibe! 14 Û
Yêremya: Derew e! Ez derbasî ali-
yê Kildaniyan nabim, got. Lê belê
wî guhdarî nekir û Îriya bi Yêrem-
ya ve girt û wî anî cem serokan.
15 Û serokan bi Yêremya ve hêrs
bûn û li wî xistin û wî xistin gir-
tîgehê, mala Yonatanê nivîskar, ji
ber ku wî xaniyî kiribûn girtîgeh.
16 Yêremya ket zîndanê û serda-

[1] Diket û derdiket.

ban û Yêremya pirr rojan li wir
ma; 17 wê gavê qiral Tsedekiya
şand û wî da anîn û qiral di mala
xwe de bi dizîka jê pirsî û got:
Ji XUDAN ve tu gotin heye? Û
Yêremya got: Heye! Û got: Tuyê
bi destê qiralê Babîlê ve bête
dayîn! 18 Û Yêremya ji qiral
Tsedekiya re got: Ma min li dijî
te û qûlên te, an jî vê neteweyê
çi sûc kir ku we min avêtin gir-
tîgehê? 19 Ka peyxamberên we
yên ku bi gotina: Dê qiralê Babîlê
bi ser we ve û bi ser vê netewê
ve neyê, peyxambertiyê dikirin
li ku derê ne? 20 Û niha ez rica
dikim guhdarî bike, ya efendiyê
min qiral; rica dikim, bila lavaya
min bikeve ber te û min şunda
neşîne mala Yonatanê nivîskar
ku ez li wir nemirim! 21 Û qiral
Tsedekiya emir da û Yêremya
xistin hewşa parêzgeran û heta ku
li bajar, bitûmî bitûmî nan qut bû,
ji kuça firnevanan her roj nanekî
somî danê. Û Yêremya di hewşa
parêzgeran de ma.

*Yêremya davêjin Sarincê*

38 Û Şefatyayê lawê Meta û
Gedalyayê lawê Paşhûr û
Yûkalê lawê Şelemya û Paşhûrê
lawê Malkiya, hemûyên van gotin-
an, ên ku Yêremya ji netewê re got,
bihîstin: 2 XUDAN wusa dibêje:
Yê ku li vî bajarî bimîne dê bi şûr
û xela û webayê ve bimire; lê belê
zilamê ku derkeve cem Kildani-
yan, dê bijî û dê canê wî jê re bibe
malê talanê û dê sax bimîne! 3 XU-
DAN wusa dibêje: Dê muheqeq ev
bajar ji destê qiralê Babîlê re bête
dayîn û dê wê bistîne! 4 Û serokan
ji qiral re gotin: Em rica dikin, bila
vî zilamî bukujin, ji ber ku wusa
dibêje û bi vî awayî destê zilamên
cengê ên ku di vî bajarî de li pêy
mayîne û destê hemûya netewê
sist dike; ji ber ku ev zilam ne li
xweşiya vê netewê, lê li xesara wê
digere! 5 Û qiral Tsedekiya got: A
vay, ew di destê we de ye; ji ber ku
qiral li dijî we tu tiştî nake! 6 Wê
gavê Yêremya rahiştin û wî avêtin
sarinca Malkiyayê lawê qiral ya
ku di hewşa parêzgeran de ye û
Yêremya bi benan ve dahelandin.
Û di sarincê de av tunebû, lê tenê
herî hebû û Yêremya bi heriyê ve
çû xwarê[1].
7 Û Ebed-Melekê Hebeşî karmen-
dê serayê li mala qiral bû û bihîst
ku Yêremya avêtine sarincê û qi-
ral di deriyê Benyamîn de rûniştî
bû 8 û Ebed-Melek ji mala qiral
ve derket û bi qiral re axifî û got:
9 Efendiyê min qiral, van zilaman di
her tiştên ku bi peyxamber Yêrem-
yayê ku avêtine sarincê kirine de,
xerabiyê kirin û li cîhê ku lê ye dê
ji birçîbûnê bimire, ji ber ku êdî
di bajêr de nan nema! 10 Û qiral

1 Di çamûrê de noq bû.

emir da Ebed-Melekê Hebeşî û
got: Ji vê derê sîh kesî bigire cem
xwe û peyxamber Yêremya berî
ku bimire ji sarincê derxîne! 11 Û
Ebed-Melek zilaman girt cem xwe
û ket mala qiral, bin odeya xezînê
û ji wir pertalên[1] çiriyayî û kincên
helisîne derxistin û wan bi benan
ve ji Yêremya re dahelandin. 12 Û
Ebed-Melekê Hebeşî ji Yêremya re
got: Niha pertalên çiriyayî û kincan
di bin ben ve bixe bin milên xwe!
Û Yêremya wusa kir. 13 Û Yêrem-
ya bi benan kişandin û wî ji sarin-
cê derxistin û Yêremya li hewşa
parêzgeran ma.

*Tsedekiya dîsa bi Yêremya re dişêwire*

14 Û qiral Tsedekiya şand û
Yêremya peyxamber da anîn cem
xwe, li cîhê ketina sêwemîn ya ku
di mala XUDAN de ye û qiral ji
Yêremya re got: Ez ê tiştekî ji te
bipirsim; ji min tiştekî veneşêre!
15 Û Yêremya ji Tsedekiya re got:
Ma ez bighînim te, tuyê muheqeq
min nekuje? Ez şîret bidim te jî tu
min guhdarî nake! 16 Û qiral Tse-
dekiya bi dizîka, ji Yêremya re
sondê da û got: XUDANê zindî
ye ku vî canî ji me re afirandiye,
ez ê bona mafê wî te nekujim û ez
ê te nedim destê van zilamên ku li
canê te digerin!
17 Û Yêremya ji Tsedekiya re
got: Xwedayê Îsraêlê, Xwedayê
artêşan, XUDAN wusa dibêje:
Ger tu ji serokên qiralê Babîlê re
derkeve; dê canê te bijî û dê ev
bajar di agir de neşewite û tu û
mala te, hûn ê sax bimînin. 18 Lê
belê ger tu ji serokên qiralê Babîlê
re dernekeve, dê ev bajar bi destê
Kildaniyan ve bête dayîn û dê wê
bişewitînin û tuyê ji destê wan ve
nikaribe bireve û xelas bibe! 19
Û qiral Tsedekiya ji Yêremya re
got: Ez ditirsim ku min bidin destê
Cihûdiyên ku derbasî Kildaniyan
bûne û ew jî qerfên xwe bi min re
bikin! 20 Û Yêremya got: Nadin!
Di tiştê ku ez ji te re dibêjim de,
dengê XUDAN bibihîze, ez rica
dikim û dê ji te re bibe qencî û dê
canê te sax bimîne! 21 Lê belê ger
tu nexwaze ku derkeve, gotina ku
XUDAN nîşanî min daye ew e:
22 A vay, dê hemû pîrekên ku li
mala qiralê Cihûdayê dimînin, dê
ji serokên qiralê Babîlê re bêne
derxistin û dê ew pîrekan bibêjin:
Hevalên te yên nêz te xapandin;
lingên te di heriyê de çûn ew
şunda vegeriyan! 23 Û dê hemû
jin û zarokên te ji Kildaniyan re
derxînin û tuyê nikaribe ji destê
wan ve bireve û xelas bibe; lê belê
dê destê qiralê Babîlê bi te bigire û
tuyê vî bajarî bide şewitandin!
24 Û Tsedekiya ji Yêremya re
got: Bila tu kes bi van gotinan
nizanibe, bi vî awayî tuyê jî

[1] Alavên.

nemire! 25 Û ger serokan bi te
re axaftina min bibihîzin û werin
cem te û: Te ji qiral re got çi û
qiral ji te re çi gotibe niha ji me
re bibêje, ji me veneşêre û em te
nakujin! bibêjin, 26 tuyê ji wan re:
Bona ku min neşîne mala Yonatan
û ez li wir nemirim, lavaya xwe
avêtim ber qiral, bibêje! 27 Û
hemûyên serokan hatin cem
Yêremya û jê pirsîn û li gor hemû
van gotinên ku qiral jê re emir
kiribûn, ji wan re got. Û êdî tiştekî
ji wî re negotin, ji ber ku tu kesî
vî karî nebihîstibû. 28 Û heta roja
Orşelîm hate stendin, Yêremya li
hewşa parêzgeran ma.

*Orşelîm dikeve û Tsedekiya dişînin Babîlê*

Yêr 52,1-27; 2.Qir 25,1-12; 2.Dîr 36,13-21

**39** Û dema Orşelîm hate sten-
din di sala nehan ya qiralê
Cihûdayê Tsedekiya de, di meha
dehan de, qiralê Babîlê Nebûkad-
netsar û hemûya artêşa wî hatin
hemberê Orşelîmê û dor û ber
lê girtin; 2 di sala yanzdehan ya
Tsedekiya de, di meha çaremîn
de, di roja nehemîn ya mehê de,
di dîwarê bajêr de baxor[1] vebûbû,
wusa bû ku, 3 hemû serokên qi-
ralê Babîlê ketin hundir û Nergal-
Şaretser, Samgar-Nebo, Sarsekîm,
Rab-Sarîs, Nergal-Şaretser, Rab-
Mag û hemû serokên qiralê Babîlê,
yên li pêy mane, di deriyê navîn
de rûniştin.
4 Û wusa bû ku, dema Tsedeki-
yayê qiralê Cihûdayê û hemû
mêrên cengê wan dîtin reviyan
û êvarê ji bajêr, di rêya bexçeyê
qiral de, ji deriyê di nav du dîwarî
de ye derketin û bi rêya Arabayê[2]
ve çûn. 5 Û artêşa Kildaniyan bera
pêy wan da û di deştên Erîhayê
de gîhaştin Tsedekiya û bi wî gir-
tin û wî birin Rîblaya ku li warê
Hamatê ye, cem Nebûkadnetsarê
qiralê Babîlê û di derheqê wî de
daraziyê da. 6 Û li Rîblayê, qiralê
Babîlê, li ber çavê wî lawên Tse-
dekiya kuşt; qiralê Babîlê hemû
pêşhatiyên Cihûdayê jî kuşt. 7 Û
çavên Tsedekiya kor kir û bona
ku wî bibe Babîlê, wî li zincîrê
xist. 8 Û Kîldaniyan mala qiral
û malên netewê şewitandin û
dîwarên Orşelîmê xera kirin. 9 Û
serekê leşkerên parêzger Nebû-
zaradan maweyên netewê ên ku
li bajêr in û yên ku derbasî aliyê
xwe bûne û maweyên netewê ên
ji ber mayîne ajotin Babîlê. 10 Û
serekê leşkerên parêzger Nebûza-
radan, zilamên ku ji xizanên nete-
wê ne û tu tiştên wan nîne, li warê
Cihûdayê hiştin û wê rojê rez û
zeviyan dan wan.

*Yêremya Azad tê berdan*

---

1 An jî qul.

2 Newala kûr ya li başûr û bakurê behra Lût e.

11 Û Nebûkadnetsarê qiralê
Babîlê bona Yêremya emir li
serekê leşkerên parêzger Nebû-
zaradan kir û got: 12 Wî bigre[1]
û baş lê binere û tiştekî xerab
bi wî neke; lê ji te re çi bibêje,
jê re wusa bike! 13 Û serekê
leşkerên parêzger Nebûzaradan û
Nebûşazban, Rab-Sarîs û Nergal-
Şaretser, Rab-Mag û hemû se-
rokên qiralê Babîlê zilam şandin
14 û şandin û Yêremya ji hewşa
parêzgeran rahiştin û bona ku
bibe malê dan Gedalyayê lawê
Ahîkamê lawê Şafan. Û di nav
netewê de rûnişt.
15 Û dema di hewşa parêzge-
ran de girêdayîbû, ev gotina
XUDAN ji Yêremya re hatibû:
16 Here û ji Ebed-Melekê Hebeşî
re bibêje: Xwedayê Îsraêlê, XU-
DANê artêşan wusa dibêje: A vay,
ez ê gotinên xwe li ser vî bajarî
ne bona qenciyê, bona xerabiyê
bînim û dê wê rojê li ber te bên
cîh. 17 Lê belê wê rojê ez ê te xe-
las bikim, XUDAN dibêje û tuyê
bi destên zilamên ku tu ji wan
bêzar dibe ve neyê dayîn. 18 Ji
ber helbet ku ez ê te xelas bikim
û tuyê bi şûr ve nekeve û dê canê
te ji te re bibe malê talanê, ji ber
ku tu bi min ewle bû! XUDAN
dibêje.

[1] Rahêje.

*Yêremya li cem Walî Gedalya dimîne*

40 Paşî ku serekê leşkerên
parêzger Nebûzaradan, di
nav hemû sirgûnên Cihûda û
Orşelîmê de ên ku bi sirgûnî wan
biribûn Babîlê bûbûn, Yêremyayê
ku bi zincîrê ve girêdayiye li Ra-
mayê berda, gotina XUDAN jê re
hat. 2 Û serekê leşkerên parêzger,
bi Yêremya ve girt û jê re got: Li
dijî vê derê Xwedayê te XUDAN
vê asîwê got 3 û XUDAN wê anî
û mîna ku gotibû kir; ji ber ku
we li dijî XUDAN sûc kirin û we
gotina wî guhdarî nekirin, ji ber
vê yekê ev kar hate serê we! 4 Û
niha, a vay, ez îroj te ji zincîrên
ku di destê te de ne vedikim. Ger
tevî min hatina Babîlê di çavê te
de qenc be, were û ez ê te baş
xwedî bikim[2]; lê belê tevî min
hatina Babîlê di çavê te de xerab
be, neyê; binêre, hemûya welêt li
ber te ye; çûyîna ku derê di çavê
te de baş û rast be, here wir! 5 Û
Yêremya hîn venegeriyabû, jê re
got: Vegere cem Gedalyayê lawê
Ahîkamê lawê Şafan, yê ku qi-
ralê Babîlê wî daniye ser bajarên
Cihûdayê û bi wî re di nav netewê
de rûnê; an jî di çavê te de çûyîna
ku derê rast be, here wir! Û serekê
leşkerên parêzger zewêde û xelatê
dayê û wî berda. 6 Û Yêremya çû
Mîtspayê, cem Gedalyayê lawê

[2] An jî: Ez ê baş li te binêrim.

Ahîkam û bi wî re di nav netewa
ku li welêt mayîne de rûniştin.

*Gedalya Waliyê Cihûdayê*

2.Qir 25,22-24

7 Û hemû serekên leşkeran ên
ku li beyarê ne ew û zilamên
wan, dema bihîstin ku qiralê
Babîlê Gedalyayê lawê Ahîkam
daniye ser welêt û mêr û jin û
zarokên ku herî xizanên welêt in
û berbi Babîlê ve nehatine sirgûn
kirin dane wî, 8 hatin Mîtspayê,
cem Gedalya: Simayîlê lawê
Netanyan û Yohanan û Yonatanê
lawên Kareah û Serayayê lawê
Tanhûmet û lawên Efayê Netofayî
û Yezanyayê lawê Maakal, ew
û zilamên wan. 9 Û Gedalyayê
lawê Ahîkamê lawê Şafan ji wan
re û ji zilamên wan re sond xwar
û got: Ji Kildaniyan re qûlitiyê
kirinê netirsin; li welêt rûnin û ji
qiralê Babîlê re qûlitiyê bikin û
dê bona we qenc be! 10 Û dema
em bên min, a vay, bona ku li
ber Kildaniyên ku ji me re werin
bisekinim, ez ê li Mîtspayê rûnim;
lê belê hûn xemr û fêkiyên havînê
û rûn bidin hev û bixin feraxên
xwe û li bajarên ku we stendine
rûnên! 11 Û hemû Cihûdiyên ku
li Moabê û di nav lawên Ammon
de û li Edomê û li hemû welatan
e, dema bihîstin ku qiralê Babîlê
ji Cihûdayê maweyekê hiştiye û
Gedalyayê lawê Ahîkamê lawê
Şafan daye ser wan, 12 ji ber ku
hemûyên Cihûdiyan ji cîhên ku
hatibûn ajotin vegeriyan û hatin
warê Cihûdayê, Mîtspayê, cem
Gedalya û zehf xemr û fêkiyên
havînê dan hev.
13 Û Yohananê lawê Kareah û
hemû serekên leşkeran ên ku li
beyarê ne hatin Mîtspayê, cem
Gedalya 14 û jê re gotin: Ma tu
pê nizanî, qiralê lawên Ammon
Baalîs, bona ku canê te bistîne,
Simayîlê lawê Netanyan şandiye?
Lê belê Gedalyayê lawê Ahîkam
bi wan bawer nekir. 15 Û Yoha-
nanê lawê Kareah li Mîtspayê bi
dizîka ji Gedalya re got: Berde ez
herim û li Simayîlê lawê Yetan-
yan bixim û dê tu kes pê nizanibe;
ma çima dê canê te bistîne û hemû
Cihûdên ku li cem te civiyane, dê
belav bibin û maweya Cihûdayê
tune bibe? 16 Lê belê Gedalyayê
lawê Ahîkam, ji Yohananê lawê
Kareah re got: Tuyê vî karî neke,
ji ber ku tu di derheqê Simayîl de
derew dibêjî!

*Gedalya têtê kuştin*

2.Qir 25,25-26

41 Û di meha heftemîn de
wusa bû ku, Simayîlê lawê
Netanyanê lawê Elîşamayê ku ji
nîjada qiral bû û ji zilamên qiral
ên mezin bû tevî wî deh kes hatin
Mîtspayê, cem Gedalyayê lawê
Ahîkam û li wir, li Mîtspayê pev

re xwarinê xwarin. 2 Û Simayîlê
lawê Netanyan û deh mirovê bi wî
re bûn rabûn û bi şûr li Gedalyayê
lawê Ahîkamê lawê Şafanê ku
qiralê Babîlê wî dabû ser welat,
xistin û wî kuştin. 3 Û Simayîl, li
hemû Cihûdiyên li Mîtspayê bi wî
re, bi Gedalya re ne û Kildaniyên
ku li wir in, li mêrên cengê xist.
4 Û paşî ku wî Gedalya kuşt û hîn
tu kesî pê nizanîbû, di roja du-
wem de wusa bû ku; 5 ji Şekemê,
Şîloyê û ji Samîriyê zilaman, wekî
rîhên wan hatine kur kirin û kin-
cên wan çiriyayî û di bedenê xwe
de birîn vekirine û bona ku bînin
mala XUDAN pêşkêşiya nan û
gunuk di destên wan de heyştê
kes hatin. 6 Û Simayîlê lawê Ne-
tanyan, bona pêşwaziyê li wan
bike, bi girî meşiya û ji Mîtspayê
derket û wusa bû ku, dema pêrgî-
niyê li wan kir ji wan re got: We-
rin cem Gedalyayê lawê Ahîkam.
7 Û wusa bû ku, dema hatin nava
bajêr, Simayîlê lawê Netanyan,
ew û zilamên ku li cem wî bûn,
wan serjê kirin û avêtin kortalê.
8 Lê belê deh kesên ku di nav wan
de bûn, ji Simayîl re gotin: Me ne-
kuje, ji ber ku di zeviyê de malê
me yî veşartî heye, genim û ceh û
rûn û hungiv! Wî jî dev jê berda
û wan tevî birayên wan nekuşt.
9 Û sarinca ku Simayîl laşê hemû
mirovên ku kuştine avêtibû hun-
dirê wê, cem Gedalya, sarinca
ku qiral Asa ji tirsa Baaşayê qi-
ralê Îsraêlê çêkiribû; Simayîlê
lawê Netanyan bi yên ku hatine
kuştin wê tijî kir. 10 Û Simayîl, li
Mîtspayê hemû maweya netewê
ên ku serekê leşkerên parêzger
Nebûzaradan daye Gedalyayê
lawê Ahîkam, qîzên qiral û hemû
netewa ku li Mîtspayê mane, ajot;
Simayîlê lawê Netanyan wan ajot
û bona ku derbasî lawên Ammon
bibe çû.
11 Lê belê dema Yohananê lawê
Kareah û hemû serekên leşkeran
ên ku bi wî re ne, hemû xerabi-
ya ku Simayîlê lawê Netanyan
kiriye bihîstin, 12 hemû zilaman
rahiştin û bona ku bi Simayîlê
lawê Netanyan re cengê bikin
çûn û wî li cem avên mezin ên ku
li Gîbeonê ye dîtin. 13 Û wusa bû
ku, dema hemû netewa li cem Si-
mayîl in, Yohananê lawê Kareah
û hemû serleşkerê bi wî re ne
dîtin kêfxweş bûn. 14 Û netewa
ku Simayîl wan ji Mîtspayê ajo-
tiye şunda vegeriyan û çûn cem
Yohananê lawê Kareah. 15 Lê
Simayîlê lawê Netanyan bi heyşt
kesî re ji ber Yohanan reviya û
xelas bû û çû cem lawên Ammon.
16 Tevî hemû serleşkerên ku li
cem wî ne, Yohananê lawê Ka-
reah, hemû maweya netewê ya ku
Simayîlê lawê Netanyan paşî ku
li Gedalyayê lawê Ahîkam xist,
ji Mîtspayê birine, yanê egîdên

cengê yên mêrxas û pîrekan û
zarokan û karmendên serayê,
hemûyên ku ji Gîbeonê şunda
anîne rahiştin[1]. 17 Û çûn û ji ber
Kildaniyan bona ku herin û bike-
vin Misirê, li Gerût-Kîmhama ku
li cem Beytlehemê ye rûniştin,
18 ji ber ku ji wan ditirsiyan; ji
ber ku Simayîlê lawê Netanyan,
li Gedalyayê lawê Ahîkamê ku
qiralê Babîlê wî dabû ser welêt,
xistibû.

*Duaya Yêremya û Bersiva XUDAN*

42 Û hemû serleşkeran û
Yohananê lawê Kareah
û Yezanyayê lawê Hoşaya û ji
biçûk heta mezin hemûya netewê
nêzîk hatin 2 û ji Yêremya pey-
xamber re gotin: Em rica dikin,
bila lavaya me bikeve ber te û
bona me, bona vê maweyê, ji ber
em zilamên hindik ên ku ji ber zê-
deyiyê mane ne, çawa ku çavên te
me dibînin; ji Xwedayê xwe XU-
DAN re dua bike ku, 3 bila Xwe-
dayê te XUDAN rêya ku em ê tê
de bimeşin û tiştê ku em ê bikin
ji me re bighîne! 4 Û peyxamber
Yêremya ji wan re got: We guh-
darî kirim; a vay, ez ê li gor go-
tinên we ji Xwedayê we XUDAN
re dua bikim û dê wusa bibe ku,
bona we XUDAN çi bersivê bide,
ez ê ji we re bighînim; ez ê tiştekî
ji we veneşêrim! 5 Û ji Yêremya
re gotin: Ger em li gor her gotina
ku Xwedayê te XUDAN bona
ku ji me re bighîne te bişîne ne-
kin, bila XUDAN di nav me de
bibe şahdeyek dilsoz û ewlekar!
6 Em ê li gotina Xwedayê xwe
XUDANê ku me te jê re şandine,
dixwaze bila gotina wî ji me re
qenc xuya bike an jî xerab guh-
darî bikin ku, dema em li gotina
Xwedayê xwe XUDAN guhdarî
bikin, bila ji me re bibe qencî!
7 Û paşî deh rojî wusa bû ku, go-
tina XUDAN ji Yêremya re hat.
8 Û bangî Yohananê lawê Ka-
reah û hemû serleşkerên ku bi
wî re ne û ji biçûk heta mezin
hemûya netewê kir 9 û ji wan re
got: Xwedayê Îsraêlê XUDANê
ku we bona ez lavaya we li ber wî
pêşkêş bikim, wusa dibêje: 10 Bi
rastî, ger hûn li vî warî bimînin,
ez ê we ava bikim û têk nabim
û ez ê we biçikînim[2] û jê rana-
kim; ji ber ez ji hemû xerabiya
ku ji we re kirim, poşman dibim.
11 Ji qiralê Babîlê ve metirsin,
hûn ku ji wî ditirsin; ji wî netir-
sin, XUDAN dibêje; ji ber bona
ku we xelas bikim û bona ku we
ji destê wî azad bikim, ez bi we re
me! 12 Bona ku ew dilovaniyê li
we bike û we bişîne axa we, ez ê
jî dilovaniyê li we bikim. 13 Lê

1 Girtin.

2 An jî: Li erdê ve bi cîh bikim.

belê hûn: Em li vî warî rûnanin,
bibêjin û bi gotina Xwedayê xwe
XUDAN guhdarî nekin û: 14 Na;
lê em ê bikevin warê Misirê, em
ê li wir cengê nebînin û dengê
boriyê nebihîzin û bona nan em ê
birçîbûnê nekişînin û em ê li wir
rûnin! bibêjin; 15 ji ber vê yekê jî,
ya maweya Cihûdayê, niha gotina
XUDAN guhdarî bikin: Xwedayê
Îsraêlê XUDANê artêşan wusa
dibêje: Ger hûn bi rastî jî berê
xwe bidin ketina Misirê û bona
ku hûn li wir bibin mêvan herin;
16 wê çaxê dê wusa bibe ku, şûrê
ku hûn jê ditirsin dê li warê Mi-
sirê, li wir bigihêje we û xelaya ku
hûn jê ditirsin dê li Misirê, li pêy
we bizeliqe û hûn ê li wir bimi-
rin! 17 Dê hemû zilamên ku bona
li Misirê bibin mêvan berê xwe
dane wir bi vî awayî tune bibin;
bi şûr, bi xela û bi webayê bimi-
rin û dê ji wan tu kes nemîne û
ji xerabiya ku ez ê bînim ser wan
nikaribe bireve û xelas bibe!
18 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê,
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Çawa hêrs û xezeba min li ser
ên ku li Orşelîmê rûdinin rijiya-
be, dema hûn bikevin Misirê, dê
xeyda min bi vî awayî bi ser we
ve birije û hûn ê, tiştekî bi naletî
û tiştekî ku şaşkirî û ya kerihan-
dinê û şermezarek bibin û êdî hûn
ê vî erdê nebînin! 19 Ya maweya
Cihûda, bona we XUDAN: Neçin
Misirê! got, qenc pê bizanibin ku
îroj şahdeyiyê li we kirim. 20 Ji
ber ku we fenekiyê li canê xwe ki-
rin, ji ber ku we min ji Xwedayê
xwe XUDAN re şandin û gotin:
Bona me ji Xwedayê me XU-
DAN re dua bike û li gor heŗ tiştê
ku Xwedayê me XUDAN bibêje,
bi wî avayî ji me re bigehîne û em
ê bikin! 21 Û îroj ji we re gîhan-
dim; lê belê di tu karê ku min ji
we re şandiye de we gotina Xwe-
dayê xwe XUDAN guhdarî neki-
rin. 22 Û niha, qenc bizanibin ku,
li cîhê ku hûn bibin mêvan diçinê,
hûn ê bi şûr, bi xela û bi webayê
bimirin!

*Yêremya dibin Misirê*

43 Dema Yêremya hemûyên
van gotinan ên ku Xwe-
dayê wan XUDAN ji wan re
bighîne, Xwedayê wan XUDAN
ji wî re şandiye, ji hemûya nete-
wê re gotin û qedandin wusa bû
ku, 2 Azaryayê lawê Hoşaya û
Yohananê lawê Kareah û hemû
zilamên qurre bi Yêremya re axi-
fîn û gotin: Tu derew dibêje: Hûn
ê bona ku li Misirê bibin mêvan
neçin wir, wê çaxê Xwedayê me
XUDAN te ji me re neşandiye;
3 lê bona ku Kildaniyan me buku-
jin û berbi Babîlê ve bajon, ji bo
vana bona tu me bidî destê wan,
Barûkê lawê Neriya te li dijî me
dikişkişîne!

4 Û Yohananê lawê Kareah û
hemû serokleşkeran û hemûya
netewê; bona ku li warê Cihûdayê
rûnin, gotina XUDAN guhdarî
nekirin. 5 Lê belê Yohananê lawê
Kareah û hemûyên serokleşkeran,
hemû maweya Cihûdayê, ên ku
ji nav hemû neteweyên ku hati-
ne ajotin, bona ku li warê Cihû-
dayê bibin mêvan şunda hatine,
6 mêran û pîrekan û zarokan û
qîzên qiral û her canên ku serokê
leşkerê parêzger Nebûzaradan
wan daniye cem Gedalyayê lawê
Ahîkamê, lawê Şafan û Yêremya
peyxamber û Barukê lawê Neri-
ya rahiştin û çûn. 7 Û ketin warê
Misirê; ji ber ku gotina XUDAN
guhdarî nekirin. Û hatin Tahpan-
hesê.
8 Û li Tahpanhesê vê gotina XU-
DAN ji Yêremya re hat: 9 Ke-
virên mezin rahêje destê xwe û
wan li ber çavên mêrên Cihûdayê,
li Tahpanhesê di qermîtgeha cîhê
ketina mala Fîrawûn de, di nav
heriyê de veşêre 10 û ji wan re bi-
bêje: Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: A vay, ez ê
bişînim û qûlê xwe Nebûkadnet-
sar rahêjim û texta wî li ser van
kevirên ku veşartime ava bikim û
dê qiral seywana[1] xwe li ser wan
ava bike. 11 Û dê were û li warê
Misirê bixe; dê yê bona mirinê
ne, ji mirinê re û yên ji sirgûnê re
ne, ji sirgûnê re û yên ku ji şûrê re
ne, ji şûrê re bên dayîn. 12 Û ez
ê di perestgeha îlahên Misirê de
agir bidim pêxistin û dê ew wan
bişewitîne û dê wan sirgûn bike
û şivanek çawa kincê xwe li xwe
bike, ew ê jî warê Misirê wusa li
xwe bike û dê bi xweşiyê ji wir
derkeve. 13 Û dê kevirên çikandî
yên Beyt-Şemeşê ên ku li Misirê
ne, bişkîne û dê malên îlahên Mi-
sirê bi agir ve bişewitîne.

*Yêremya li Misirê Cihûdan îkaz dike*

44 Bona yên li warê Misirê rû-
dinin, bona hemû Cihûdi-
yên ku li Mîgdolê û li Tahpanhesê
û li Memfîsê û li warê Patrosê rû-
dinin ev gotin ji Yêremya re hat:
2 Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: We hemû
xerabiya ku anîme ser Orşelîmê û
ser hemû bajarên Cihûdayê dîtin
3 û bi çûyîna ku ji îlahên wekî
din ên ku ew û bapîrên we û hûn
pê nizanin re, buxur vêxistinê û
qûlitî kirinê, ji ber xerabiyên ku
bona min hêrs bikin kirine, a vay,
îroj bajar xeraben e û qet kesê ku
tê de rûdinê tune. 4 Û bi lez kirin
û şandinê hemû qûlên xwe yî pey-
xamber ji we re şandim û: Ax, vî
tiştê mekrûh ê ku ez jê dikerihim
nekin! gotim.
5 Lê belê guhdarî nekirin û bona
ku ji îlahên wekî din re buxurê vê-

1 Çardax, kon, an jî: Textê serweriyê.

nexin û ji xerabiyên xwe vegerin,
guh nedan. 6 Ji ber vê yekê xeyd
û hêrsa min ji ser ve çû û rijiya û
li bajarên Cihûdayê û li kuçeyên
Orşelîmê pê ket û mîna ku îroj
wusa ye, bûn xerabe û wêrane!
7 Û niha Xwedayê Îsraêlê, Xwe-
dayê artêşan XUDAN wusa
dibêje: Bona ji bo we mawe nemî-
ne, ji we mêr û jinê, zarok û yê ku
di pêsîrê de ye ji hundirê Cihûdayê
ve jêkim û bavêjim, 8 li warê Mi-
sirê ya ku hûn bi mêvanî çûnê, ji
îlahên wekî din re buxurê vêxistin
û bi karê destên xwe ve we bona
hêrs bûna min, ma çima bona jêki-
rin û avêtinê û bona di nav hemû
neteweyên dinê de bibin bi naletî
û şermezarî hûn vê xerabiya me-
zin li canên xwe dikin?
9 Ma we xerabiyên bapîrên xwe
û xerabiyên qiralên Cihûdayê û
xerabiyên pîrekên wan û xerabi-
yên xwe û xerabiyên pîrekên xwe
ên ku li warê Cihûdayê û li kuçe-
yên Orşelîmê kirine ji bîr kirin?
10 Heta îroj xwe nizm nekirin û
netirsiyan û di şerîet û zagona ku
danîme ber we û ber bapîrên we
de nemeşiyan!
11 Ji ber vê yekê Xwedayê Îsraêlê,
XUDANê artêşan wusa dibêje: A
vay, ez ê bona xerabiyê, bona ku
hemûya Cihûdayê jêkim û bavêjim
berê xwe bidim we. 12 Û ez ê ma-
weya Cihûdayê ya ku bona li warê
Misirê bibin mêvan berê xwe dane
wir bigirim dest[1] û dê gişt biqeli-
hin; dê li warê Misirê bikevin; bi
şûr û xelayê dê biqelihin; ji biçûk
heta mezin dê bi şûr û xelayê bi-
mirin û dê bibin bi naletî û ţişteki
ku şaşkir û dikerihîne û dê bibin
şermezariyek! 13 Û çawa bi şûr û
bi xelayê û bi webayê sehêtiyê li
Orşelîmê kiribim, ez ê bi vî awayî
sehêtiyê li yên ku li warê Misirê
rûdinin jî bikim 14 û dê ji maweya
Cihûdayê, yên ku bona mêvanti-
yê li Misirê bikin çûne wir û bona
ku li warê Cihûdayê rûnin bêriya
vegera wir dikin, kesî ku bona ve-
gere wir bireve û xelas bibe û bê
berdan nebe, lê xeynî çend kesên
ku reviyane û xelas bûne dê tu kes
venegere!
15 Û hemû zilamên dizanibûn ku
jinên wan ji îlahên wekî din re
buxurê vêdixin û hemû pîrekên
ku li wir disekinîn, civakek me-
zin, hemû netewa ku li warê Mi-
sirê li Patrosê rûdinin, bersivê dan
Yêremya û gotin: 16 Di gotina ku te
bi navê XUDAN gotiye de em ê te
guhdarî nekin. 17 Lê belê bona ku
em ji qiralîçeya ezmanan re buxurê
vêxin û jê re pêşkêşiyên rijandinê
birijînin, hemû gotinên ku ji devê
me derketine em ê muheqeq bikin,
çawa ku me û bapîrên me, qiralên
me û serokên me, li bajarên Cihû-
dayê û li kuçeyên Orşelîmê kirin:

1 Dest bavêjim wan.

wê çaxê em têrî nan dibûn û me
qenciyê didîtin û xerabiyê nedîtin!
18 Lê ji wexta ku me dev ji buxur
vêxistina û ji rijandina pêşkêşiya
rijandinê ya ku ji qiralîçeya ezma-
nan re ne berdan, em bûne motajî
her tiştî û bi şûr û xelayê helaq bûn.
19 Û dema me ji qiralîçeya ezma-
nan re buxurê vêdixistin û jê re
pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş di-
kirin, gelo bêagahiya zilamên xwe
me bona peristinê jê re pîdeyan çê-
dikirin û jê re pêşkêşiyên rijandinê
dirijandin?
20 Û Yêremya bi hemûya nete-
wê re bi mêran û bi pîrekan re, bi
hemû netewa ku wê bersivê dane
wî re axifî û got: 21 Ma buxura
ku we û bapîrên we û serokên
we û ya ku netewa we li bajarên
Cihûdayê û li kuçeyên Orşelîmê
şewitandine, XUDAN neanî
bîranîna xwe û ma nehat bîra wî?
22 Û XUDAN ji ber xerabiya
karên we û ji ber tiştên mekrûh
ên ku we kirine, êdî deyax nekir û
mîna ku îroj wusa ye, di nemayi-
ya ku tu kes tê de nîne, welatê we
bû wêranxane û bû tiştekî ku şaş
dike û dikerihîne. 23 Madem ku
we buxurê vêxistin û madem ku
we li dijî XUDAN sûc kirin û we
gotina XUDAN guhdarî nekirin û
di şerîeta wî de û di zagonên wî de
û di şahdeyiyên wî de nemeşiyan,
ji ber vê yekê, mîna ku îroj wusa
bû, ev xerabiya hate serê we!
24 Û Yêremya ji hemûya netewê
û ji hemû pîrekan re got: Hemû
Cihûdaya ku li warê Misirê ne,
gotina XUDAN guhdarî bikin!
25 Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan bi vî awayî diaxife û
dibêje: We û pîrekên we bi gotina:
Qewlên ku me bona ji qiralîçeya
ezmanan re buxurê vêxin û bona
jê re pêşkêşiyên rijandinê biri-
jînin qewil kirine, em ê muheqeq
bikin, bi devê xwe gotin û bi des-
tên xwe we anîn cîh; bi qewlên
xwe bigirin û qewlên xwe bînin
cîh! 26 Hemû Cihûdên li warê
Misirê rûdinin, ji ber vê yekê go-
tina XUDAN guhdarî bikin! A
vay, min li ser navê xwe yî me-
zin sond da ku, XUDAN dibêje,
êdî li hemû warê Misirê dê qet
bi devê zilamekî Cihûdayê navê
min bi gotina: Bona heqê Xudan,
XUDANê ku zindî ye! neyê bang
kirin. 27 A vay, ez hişyar dimî-
nim û ne bona qenciyê, lê bona
xerabiyê li benda wan dimînim
û heta hemû mêrên Cihûdayê
ên ku li warê Misirê ne biqedin,
dê bi xela û şûr ve helaq bibin.
28 Û yên ku ji şûr ve birevin û
xelas bibin, zilamên ku hejmarên
wan hindik in, dê ji warê Misirê
vegerin warê Cihûdayê û hemû
maweya Cihûdayê ên ku bona
li warê Misirê bibin mêvan çûne
wir, dê bizanibin ku gotina kî
dimîne, ya min, an ya wan? 29 Û

helbet, bona ku hûn bizanibin dê
gotinên min bona xerabiyê li dijî
we bisekinin, XUDAN dibêje, dê
nîşana ku ez ê li vê derê sehêtiyê
li we bikim ev bibe; 30 XUDAN
wusa dibêje: A vay, çawa qiralê
Cihûdayê Tsedekiya dabim destê
qiralê Babîlê Nebûkadnetsarê ku
neyarê wî ye û li canê wî digere,
ez ê qiralê Misirê Hofra jî bi vî
awayî bidim destê neyarên wî û
yên ku li canê wî digerin.

*Agahî ji Barûk re*

45 Di sala çaremîn ya Yeho-
yakîmê lawê Yoşiyayê
qiralê Cihûdayê de, Barûkê lawê
Neriya, dema van gotinan ji devê
Yêremya ve li pirtûkê dinivîsand,
Yêremya peyxamber vê gotinê
jê re got: 2 Ya Barûk, bona te
Xwedayê Îsraêlê XUDAN wusa
dibêje: 3 Te: Niha wey li serê
min! Ji ber ku XUDAN keserê
tevî janên min kir; ez ji nalîna
xwe westiyam û ez rehetiyê nabî-
nim! got. 4 Tuyê jê re wusa bibêje:
XUDAN wusa dibêje: A vay, ya
ku ava kirime ez ê xera bikim û
ya ku çikandime ez ê ji cîh rakim,
him jî li hemûya welêt. 5 Û ma tu
bona xwe li tiştên mezin digere?
Negere! Ji ber ku a vay; ez ê xe-
rabiyê bi ser hemû mirovahiyê ve
binim, XUDAN dibêje; lê belê li
hemû cîhên ku tuyê here ez ê canê
te wekî malê talanê bidim te!

*Misir li Karkemîşê mexlûb dibe*

46 Gotina XUDAN ya bona
neteweyan ji Yêremya
peyxamber re hatiye:
2 Bona Misirê: Bona artêşa qiralê
Misirê Fîrawûn-Neko; ew artêşa
ku, li Karkemîşa ku li cem çemê
Feratê ye bû û di sala çaremîn ya
Yehoyakîmê lawê Yoşiyayê qi-
ralê Cihûdayê de Nebûkadnetsarê
qiralê Babîlê lê xist.
3 Mertala biçûk û mertala me-
zin amade bikin û bikevin cengê!
4 Hespan lêkin[1] hûn jî li wan siwar
bibin, ya siwarno! Û kumzirxê li
xwe bikin û rabin; rimên xwe tûj
bikin, zirxan li xwe bikin! 5 Çima
vêya dîtim? Bêzar bûn û şunda ve-
geriyan û egîdên wê li erdê ve hatin
xistin û bi lezî reviyan û li pêy xwe
nenihêrtin; bi hawirdor bêzarî! XU-
DAN dibêje. 6 Yê ku ling sivik e
bila nereve û egîd bila nereve û xe-
las nebe; li bakur, li cem çemê Fe-
ratê tilpekî bûn û ketin! 7 Ev ya ku
mîna Nîlê bilind dibe kî ye? Avên
wê mîna şetan diçelqin. 8 Ya ku
mîna Nîlê bilid dibe Misir e û avên
wê mîna çeman diçelqin û dibêje:
Ez ê bilind bibim û rûyê erdê dagi-
rim; bajaran û yên ku li wir rûdinin
tune bikim! 9 Ya hespino, rabin
ser du lingan; erebeyên cengê, êrîş
bikin û egîdan, bila Kûş û Pûtê ku

[1] An jî: Bidin baz dan.

mertalê bikartînin û Lûdiyên ku
kevanê bikar tînin û dijdînin bila
derkevin! 10 Ji ber ku ew roj, roja
Xudanê artêşan XUDAN e, bona
ku ji neyarên xwe ve tolê hilde, roja
tolê ye û dê şûr bixwe û têr bibe û
têr ji xwîna wan vexwe; ji ber ku
li warê bakur li cem çemê Feratê
qurbana Xudanê artêşan XUDAN
heye! 11 Ya tu, qîza Misirê ya ku
neçûye mêr; here Gîleadê û mer-
hemê bistîne! Tu badî hewa zehf
derman bikar tîne; bona te başbûn[1]
nîne! 12 Neteweyan şermezariya te
bihîstin û rûyê erdê bi feryada te ve
tijî; ji ber ku egîd li egîd ket, her du
jî pev re ketin.
13 Gotina XUDAN ya ku di der-
heqê qiralê Babîlê Nebûkadnetsar
de dê were û li warê Misirê bixe ji
Yêremya peyxamber re gotiye.
14 Li Misirê bang bikin û li Mîg-
dolê bidin bihîstin û li Memfîsê
û li Tahpanhesê bidin bihîstin!
bibêjin: Rabe û amade be! Ji ber
ku şûr yên li dora te ne xwarin û
qedandin. 15 Ma çima mêrên te
yên xwurt hatin maltin? Li cîhê
xwe nesekinîn, ji ber ku XUDAN
wan qewirand! 16 Yên ku dikevin
zêde kirin, belê, bi ser hev û din re
ketin û gotin: Rabin ku em ji ber
şûrê xedar vegerin netewa xwe û
warê ku em lê hatine dinê! 17 Li
wir bang kirin: Fîrawûnê qiralê
Misirê şematekarek e; firsend ji
dest berda[2]! 18 Qiralê ku navê wî
XUDANê artêşan e dibêje: Bona
mafê hebûna min; dê rastî mîna di
nav çiyayan de çiyayê Taborê û
Karmela li cem behrê ye were! 19
Ya tu, qîzika ku li Misirê rûdinê,
bona sirgûntiyê pertalê xwe ama-
de bike, ji ber ku dê Memfîs bibe
wêranxane û bişewite, kesî ku tê
de rûnê dê tune be! 20 Misir çêle-
kek ciwan û zehf xweşik; lê belê
ji bakur ve tê, mêşa kera tê! 21 Di
hundirê wê de leşkerên wê yên bi
mîşe jî mîna golikên qelew; ji ber
ku ew jî şunda vegeriyan û gişt pev
re reviyan, li cîhê xwe nesekinîn;
ji ber ku roja wanî bêtariyê, dema
wanî sehêtî li wan kirinê bi ser
wan ve hatibû. 22 Dê mîna mara
ku dimeşe xişîna wê hebe; ji ber ku
dê bi artêşê re bimeşin û dê li dijî
wê mîna yên ku êzingan jêbikin bi
biviran ve werin. 23 Ger darên wê
neyên jimartin jî, dê dîsa daristana
wê jêbikin, XUDAN dibêje; ji ber
ku ew ji kulliyan zêdetir in û nayên
jimartinê. 24 Dê qîza Misirê bête
şermezar kirin; dê bi destê netewa
bakur ve bête dayîn. 25 Xwedayê
Îsraêlê, XUDANê artêşan dibêje:
A vay, ez ê sehêtiyê li Amonê ku
li bajarê Noyê ye û li Fîrawûn û
Misirê û îlahên wan û qiralên wan
û Fîrawûn û yên ku pê ewle ne

1 Şîfa, îlaç nîne, an jî: Derman nîne.

2 An jî: Tam wextê winda kir (revand).

bikim 26 û ez ê wan bidim destê yên ku li canên wan digerin û destê qiralê Babîlê Nebûkadnetsar û destê qûlên wî û paşî wê mîna rojên berê dê li wir bête rûniştin, XUDAN dibêje.
27 Lê belê, ya qûlê min Aqûp tu metirse û ya Îsraêl, tu nekeve bêzariyê! ji ber ku a vay, ez ê te ji dûr ve û nîjada te ji warê wanî sirgûniyê xelas bikim û dê Aqûp şunda were û dê rehetiyê bibîne û bê xem be û dê kesî ku wî bitirsîne tune be. 28 Qûlê min Aqûp, tu metirse, XUDAN dibêje; ji ber ku ez bi te re me; ji ber ku ez ê hemû neteweyên ku te bi nav wan ve ajotibûm, bitûmî biqedînim; lê belê ez bitûmî dawiya te naynim, lê ez ê te bi dadiyê perwerde bikim û ez ê te qet bêceza nehêlim.

*Daxuyaniya di derbarê Filistiyan de*

47 Gotina XUDAN ya berî ku Fîrawûn li Gazayê bixe, bona Filistiyan ji Yêremya peyxamber re hatiye:
2 XUDAN wusa dibêje: A vay, ji bakur av bilind dibin û dê ew ê bibin lehiyên xuroş û dê bi ser warê û hemûyên ku tê de ne û bi ser bajêr û yên ku tê de rûdinin ve bikeve û dê mirov feryadê bikin û her kesên ku li warê rûdinin dê biûrin. 3 Ji dengê neynûkên li erdê dikevin ên hespên wê yî xwurt, ji welwela erebeyên wê yî cengê, ji şemateya tekerên wê, ji ber ku destên wan sist bûne, bav venagerin û li lawên xwe nanihêrin. 4 Ji ber ku bona her alîkarê ji Sûr û Saydayê mane jê bike û bavêje, roja helaq kirina hemû Filistiyan hat; ji ber ku dê XUDAN Filistiyan, maweya giraveya Kaftorê helaq bike! 5 Gaza porê xwe lîçikand! Tevî maweya newalên Aşkelonê hate daxistinî tuneyiyê! Ka heta kengê tuyê di bedena xwe de birînê veke? 6 Ya tu, şûrê XUDAN! Heta çi wextî tuyê bêdeng nebe? Bikeve kalana xwe; rehet bike û hiş be! 7 Ma XUDAN emir daye te, tuyê çawa hiş bike? Wê şand wir Aşkelonê û hemberî qeraxa behrê.

*Daxuyaniya di derbarê Moabê de*

Îşa 15 û 16; Hêz 25,8-11

48 Bona Moabê:
Xwedayê Îsraêlê, XUDANê artêşan wusa dibêje: Çi heyf li Neboyê! Ji ber ku bû xerabe; Kîryataîm şerm kir, hate stendin; Mîsgab şerm kir û bêzar bû!
2 Êdî pesnahiya Moabê nema; li Heşbonê li dijî wê xerabiyê fikirîn: Werin, em wê jêkin û bavêjin û dê êdî nebe neteweyek! Dê dengê te jî bête birîn ya Madmen; dê şûr bera te bide! 3 Ji Horonaîmê dengê qêrînê, şelandin û şikestina mezin!
4 Moab şikest; feryada çêlikên wê hatin bihîstin! 5 Ji ber ku bi girî

kaşê Lûhîtê hildikişin; ji ber ku
di daketina Horonaîmê de ji ber
şikestinê qêrîna tengasiyê bihîstin.
6 Birevin, canên xwe xelas bikin
û bibin mîna kiferiya li çolê ye!
7 Ji ber bona ku tu bi karên xwe
û bi xezîneyên xwe ewle bûye,
tuyê jî bête stendin û dê Kemoş bi
kahînên xwe û bi serokên xwe re
derkeve sirgûnê. 8 Û mîna ku XU-
DAN gotiye dê helaqkir bi ser her
bajarî ve were û dê tu bajar xelas
nebe û dê newal tune bibe û dê deşt
xera bibe. 9 Bazikan bidin Moabê
ku bila bifire û here; dê bajarên wê
jî wêran bibin, kesî ku di wan de
rûnê dê nemînin! 10 Yê ku bi sistî
karê XUDAN çêdike, bila bi nalet
be û yê ku şûrê xwe ji xwînê ve
diparêze bila bi nalet be!

11 Moab ji zarokantiya xwe ve
bêxem bû û mîna xemrê tilpa wê
li ser wê ve bicîh bû û ji feraxê ne-
hat vala kirinî feraxekî din û neçû
sirgûnê; ji ber vê yekê tahma xwe
winda nekir û bêhna wê nehat gu-
hertin. 12 Ji ber vê yekê XUDAN
dibêje, rojên ku ez ê zilamên wê
ji feraxekî valayî feraxekî din
bikin bişînim, a vay, tên û dê
wê birijînin û dê feraxên wî vala
bikin û dê kûpên wî biperçiqînin.
13 Mala Îsraêlê ji Beytela ku pê
ewle bûn çawa şerm kiribin, dê
Moab jî bi vî awayî ji Kemoş
şerm bike. 14 Ma çawa hûn
dibêjin: Em egîd in û bona cengê
zilamên mêrxas in? 15 Moab xera
bû û hilkişiyan bajarên wê û bona
egîdên bijartî serjê bikin dake-
tin, Qiralê ku navê wî XUDANê
artêşan e dibêje. 16 Hatina bêta-
riya Moabê nêzîk e û asîwa wê
diteqize û tê. 17 Ya hûn, hemûyên
ku li dora wê ne û yên tim bi navê
wê dizanin! bona wê fixan bikin
û bibêjin: Gopalê quwetê, çoyê
xweşik çawa şikest! 18 Ya tu, qîza
ku li Dîbonê rûdinê, ji bilindahi-
ya xwe dakeve jêr û li cîhê ziwa
rûnê! Ji ber yê ku Moabê xera kir
li dijî te derket, bircên te xera kir.
19 Ya tu, yê ku li Aroerê rûdinê!
Li qeraxa rêyê bimîne û biseki-
ne; ji mêrê ku reviyaye û ji pîreka
ku xelas bûye bipirse: Ka çi bû?
bibêje. 20 Moab şerm kir; ji ber
ku xera bû; biure û feryadê bike;
xerabûna Moabê li cem Arnonê
bigehînin! 21 Ji welatê deştê re,
ji Holonê re û ji Yahtsayê re û ji
Mefaatê re 22 û ji Dîbonê re û ji
Neboyê re û ji Beyt-Dîblataîmê
re 23 û ji Kîryataîmê re û ji Beyt-
Gamûlê re û ji Beyt-Meonê re
24 û ji Keriyotê re û ji Botsrayê re
û dûr û nêzîk ji hemû bajarên warê
Moabê re darazî hatin. 25 Qiloçê
Moabê hate jêkirin û bazûya wê
şikest, XUDAN dibêje.

26 Wê serxweş bikin; ji ber ku li
dijî XUDAN xwe mezin kir û dê
Moab di nav verşiya xwe de ve-
gevize û dê ew jî bibe pêkenok!

27 Ji ber ku, ma Îsraêl ji te re nebû
pêkenok? Ma di nav dizan de hate
dîtin? Ji ber her ku bona wê tête
gotin, tu serê xwe kil dike. 28 Ya
hûn, yên ku li Moabê rûdinin, dev
ji bajaran berdin û li zinaran rûnin
û bibin mîna kevoka ku hêlîna xwe
di devê kendalê de çêdike! 29 Me
kubra Moabê û bi zehf betranbûna
wê, mezintî firotina wê û quretî û
kanciya wê û bi kubirbûna dilê wê
bihîstin. 30 Ez bi xezeba wê diza-
nim, XUDAN dibêje, tuneyiyek
e; pesnahiyên wê tu tiştî nekirin.
31 Ji ber vê yekê ez ê bona Moa-
bê biurim; belê, ez ê bona hemûya
Moabê feryadê bikim; dê bona
zilamên Kîr-Heresê şînê bigirin.
32 Ez ê bona te ji giriyê Yazerê
zêdetir bigirîm, ya mêwa Sîb-
mayê; şivên te behrê derbas kirin,
gîhaştin behra Yazerê; xerabkir
ket ser fêkiyên te yî havînê û rez
xerakirina te. 33 Ji zeviya hilber
û warê Moabê ve kêfxweşî û şahî
hatin rakirin û ji mahseran xem-
rê birrîm; dê tu kes bi qêrînê tirî
nedewisîne; dê qêrîn ne ew qêrîn
be. 34 Ji qêrîna Heşbonê heta
Elealeyê, Yahatsê, ji Tsoarê heta
Horonaîmê, heta Eglat-Şelîşiyayê
dengên xwe dan bihîstin; ji ber
ku dê avên Nîmrîmê jî xera bi-
bin. 35 Û ez ê, yê ku li cîhê bilind
pêşkêşiyê pêşkêş dike û ji îlahên
xwe re buxurê vêdixe, li Moabê
biqedînim, XUDAN dibêje.
36 Ji ber vê yekê bona Moabê
dilê min mîna neyê dinale; bona
mêrên Kîr-Heresê dilê min mîna
neyê dinale; ji ber vê yekê malê
ku zêde dikir tune bû. 37 Ji ber ku
porê her seriyî hatiye lîçikandin û
her rîh hatiye jêkirin; li ser hemû
destan birîn û li piştan cilik heye.
38 Di hemû xanî û qadên Moabê
de, li her derê li xwe xistin heye;
ji ber ku Moabê mîna feraxekî ku
tu kes wê naecibîne şikestandim,
XUDAN dibêje. 39 Çawa xera
bû! Çawa diûrin! Moab ji ber
şermezariya xwe çawa paşê xwe
zivirand! Û Moab bona hemûyên
ku li dorê ne, dê bibe sedema pê-
kenok û bêzariyê. 40 Ji ber ku
XUDAN wusa dibêje: A vay, dê
mîna qertelê bifire û li dijî Moabê
dê baskên xwe veke! 41 Keriyot
hate stendin û birc ketin dest û dê
wê rojê dilê egîdên Moabê bibe
mîna dilê pîreka ku janê dikişîne.
42 Û dê Moab xera bibe û dê ji
netewebûnê ve derkeve, ji ber ku
li dijî XUDAN xwe mezin kir.
43 Ya tu, yê ku li Moabê rûdinê,
bêzarî û kortal û dafik li ser te ne!
XUDAN dibêje. 44 Yê ku ji bêza-
riyê bireve, dê bikeve kortalê û yê
ku ji kortalê derkeve, dê bikeve
dafikê; ji ber ku ez ê bi ser wan, bi
ser Moabê ve sala wanî sehêtiyan
kirinê bînim! XUDAN dibêje.
45 Revok di siya Heşbonê de
bê teqet sekinîne; ji ber ku ji

Heşbonê agir û ji nava Sîhonê
pêt derketin û quncika Moabê û
tasa serê lawên welwelê xwar û
qedandin. 46 Wey li te, ya Moab!
Netewa Kemoş tune bû! Ji ber ku
lawên te bi sirgûnî hatin stendin
û qîzên te ji dîlitiyê re hatin birin.
47 Lê belê ez ê di rojên dawîn
de sirgûnên Moabê şunda bînim,
XUDAN dibêje. Daraziya Moabê
heta vê derê ye.

*Daxuyaniya di derbarê Ammoniyan de*
Hêz 25,1-7

49 Bona Ammoniyan:
XUDAN wusa dibêje: Ma
lawên Îsraêl nîn in? Ma mêras-
xwerê wê nîne? Wê gavê, ma
çima Malkam[1] Gadê ji xwe re kir
milk û netewa wî di bajarên wê de
rûdinin? 2 Ji ber vê yekê XUDAN
dibêje, a vay, rojên ku ez ê qêrîna
lawên Ammon, ya ku li dijî bajarê
Rabbayê ye bidim bihîstin tên û
dê bibe girikek tena û dê gundên
wê bên şewitandin û dê Îsraêl yên
ku xwe kirine milk ji xwe re bike
milk, XUDAN dibêje. 3 Biqêre,
ya Heşbon! Ji ber ku Ayê xera
bû; feryadê bikin, qîzên Rabbayê!
Cilikan li xwe bikin; li xwe bixin
û di nav çîtan de bi vir û wir ve
baz bidin; ji ber ku dê tevî kahîn
û serokên xwe Malkam here sir-
gûnê. 4 Ya qîzika ceban! Ma çima
tu bi newalan, bi newala xwe yî
avî pesnê xwe dide? Tu ku, tu bi
xezîneyên xwe ve ewle dibû; te:
Ka dê kî were ser min? digot. 5 A
vay, ez ê ji hemûyên ku li dora te
ne bêzariyê bînim ser te, Xudanê
artêşan XUDAN dibêje û hûn ê
bên ajotin, her kes dê bi hêla ku
derkeve pêşiya wî û kesî ku re-
vokan bide hev, dê tune be! 6 Lê
belê paşî wê ez ê sirgûnên lawê
Ammon şunda bînim, XUDAN
dibêje.

*Daxuyaniya di derbarê Edomê de*
Hêz 25,12-14; Oba 1,21; Îşa 34

7 Bona Edomê:
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Ma êdî li Temanê zanyarî ne-
maye? Ma di zilamên fêhmkar de
şîret çikiyan? Ma zanyariya wan
vala bû? 8 Birevin, şunda vegerin,
li cîhên kûr ve rûnên, ya yên ku
li Dedanê rûdinin! Ji ber ku dema
ez sehêtiyê li Esav bikim, ez ê
asîwa wî bînim ser wî. 9 Ger yên
ku rez xera dikin ji te re bihatiba-
na, gelo tiriyê ku ji ber mayîne
nedihiştin? Ger şevê diz bihatana,
qasî ku dixwestin xera nediki-
rin? 10 Lê belê min Esav şeland[2],
cîhên wî yên veşartî vekirim û dê
nikaribe xwe veşêre; nîjada wî
û birayên wî û cîranên wî helaq
bûn, ew bi xwe jî tune bû. 11 Za-

1 An jî: Qiralên wan.
2 Tazî kir.

rokên xwe yên bêbav bihêle, ez ê
wan bijînim û bila jinebiyên te bi
min ewle bibin! 12 Ji ber ku XU-
DAN wusa dibêje: Ew ku, ne ji
zilamên ji tasê vedixwin in, a vay,
helbet wê vexwin û ma yê bitûmî
bê ceza bimîne tu yî? Tuyê bêceza
nemîne, lê helbet ku tuyê vexwe!
13 Ji ber ku bi ser xwe sondê dam,
XUDAN dibêje, dê Botsra bibe
tiştekî şaşkir û şermezarî, dê bibe
çol û naletî û dê hemû bajarên wê
bibin xerabeyên abadîn!
14 Ji XUDAN agahiyê bihîstim
û bona ku here nav neteweyan
şandiyek jî hate şandin: Bicivin
û li dijî wî rabin û bona cengê
rabin! 15 Ji ber ku a vay, te di
nav neteweyan de biçûk û di nav
mirovan de kêm kirim. 16 Dema
em werin tirsehêzbûna te, xirûra
dilê te, te xapand, tu ku, tu di nav
qulên zinarê de rûdinê, tu ku, tu
bi sertapa hevrazê ve digire; ger
tu hêlîna xwe mîna qertel bilind
deyne jî, ez ê te ji wir daxim! XU-
DAN dibêje. 17 Û dê Edom bibe
tiştekî ku şaş dike; her kesê ku ji
wir derbas bibe, dê şaş bimîne û
ji ber hemû asîwên wê dê bifike.
18 Mîna ku di dema Sodom û Go-
mora û bajarên cîran bi ser û binî
bûne de çawa be, dê tu kes li wir
rûnenê, XUDAN dibêje û a vay,
dê mirov li wir nebe mêvan. 19 A
vay, dê li dijî bajarê xwurt, mîna
şêrekî ji nepixa Urdunê ve dê der-
keve; ji ber ku ez ê wan nişka ve ji
wir birevînim û kî bête hilbijartin
ez ê wî deynim ser wê; ji ber ku
ma yê wekî min e, kî ye? Û yê ku
dozê li min veke kî ye? Û şivanê
ku dê li ber min bisekine, kî ye?
20 Ji ber vê yekê biryara XUDAN
ya li dijî Edomê û ramanên wî ên
li dijî yên ku li Temanê rûdinin
guhdarî bikin: Bi rastî dê wan,
biçûkên keriyên wan jî bajon;
rastî, dê welatên wan li ser wan
xera bike! 21 Ji welwela keti-
na wan erd dilerize; qêrîn heye,
şemateya wê ji Behra Gewez ve
tête bihîstin. 22 A vay, dê mîna
qertelê bilind bibe û bifire û li dijî
Botsrayê dê baskên xwe veke û dê
wê rojê dilê egîdên Edomê bibe
mîna dilê pîreka ku jana welidan-
dinê dikişîne!

*Daxuyaniya di derbarê Şamê de*

Îşa 17,1-3

23 Bona Şamê:
Hamad û Arpad şerm kirin; ji ber
ku agahiya xerab bihîstin, huli-
yan, di behrê de xem heye, rehet
nake. 24 Şam sist bû, bona ku
bireve zivirî û lerizandin pê girt;
mîna pîreka ku dizê tengasî û jan
pê girtin. 25 Bajarê bi nav û deng,
bajarê ku şabûnê tê de dibînim,
çima nehat berdan? 26 Ji ber vê
yekê dê di qadên wê de egîdên wê
bikevin, dê wê rojê hemû mêrên
cengê bên bêdeng kirin, XU-

DANê artêşan dibêje. 27 Û ez ê
di dîwarê Şamê de agir pêxim û
dê qesrên Ben-Hadad bixwin û
biqedînin!

*Daxuyaniya di derbarê Kedar û
Hatsorê de*

28 Bona welatên Kedar û Hatsora
ku qiralê Babîlê Nebûkadnetsar li
wan xistiye.
XUDAN wusa dibêje: Rabin,
derkevin Kedarê û lawên rojhilatê
helaq bikin! 29 Dê çadirên wan û
keriyên wan rahêlin; dawên ça-
dirên wan û hemû feraxên wan û
deveyên wan, dê bona xwe bibin
û dê bi gotina: Li hawirdor bêzarî!
bi wan re biqêrîn. 30 Ya hûn, ên
ku li Hatsorê rûdinin, birevin, bi
dûra ve belav bibin, di cîhên kûr
de rûnên! XUDAN dibêje; ji ber
ku qiralê Babîlê Nebûkadnetsar
li dijî we şîretê girt û fikrê wî yê
li dijî we heye. 31 Rabin û bi ser
netewa ku bê xem û di ewlekariyê
de rûdine ve bimeşin! XUDAN
dibêje; deriyên wê û çilmêreyên
wê nîne, tena serê xwe rûdinê. 32
Û dê deveyên wê yexme bibin û
keriyên wê yî bêhêjmar, dê bibin
malê talanê û ez ê wan zilamên
ku serê rîhên wan kur kirî ne, bi
hemû bayan ve belav bikim û ez
ê ji her alî ve asîwên wan bînim,
XUDAN dibêje. 33 Û dê Hatsor
bibe cîhê çeqel û wêranxaneya
abadîn; dê tu kes li wir rûnenê û
dê mirov li wir nebe mêvan.

*Daxuyaniya di derbarê Elamê de*

Hêz 32,24-25

34 Di destpêka qiraletiya Tse-
dekiyayê qiralê Cihûdayê de, ji
Yêremya peyxamber re bona
Elamê vê gotina XUDAN hat:
35 XUDANê artêşan wusa dibêje:
A vay, ez ê kevana Elamê, hêza
wê ya serete bişkînim. 36 Û ji
çar nîçikên erdê ez ê çar bayî bi
ser Elamê ve bînim û ez ê wan
bi hemûyên van bayan ve belav
bikim û dê qet tu netewe tune be
ku, sirgûnên Elamê neçe cem wê.
37 Û li ber neyarên wê û li ber yên
ku li canê wê digerin, ez ê Elamê
bêzar bikim û ez ê xerabiyê û hêr-
sa xwe yî sor bînim ser wan, XU-
DAN dibêje û heta ku wan biqe-
dînin, ez ê şûr li pêy wan bişînim
38 û ez ê li Elamê texta xwe
deynim û ez ê ji wir qiral û sero-
kan tune bikim, XUDAN dibêje.
39 Lê belê dê di rojên dawîn de
wusa bibe ku, ez ê sirgûnên Elamê
şunda bînim, XUDAN dibêje.

*Daxuyaniya di derbarê Babîlê de*

Îşa 13 û 14; 21,1-10; 47; Pey 18

50 Bona Babîlê, bona welatê
Kildaniyan gotina ku XU-
DAN bi navdîtiya Yêremya pey-
xamber ve gotiye:
2 Di nav neteweyan de bibêjin
û bidin bihîstin û alê biçikînin;
bidin bihîstin û veneşêrin! Babîl

hate stendin, Bel şerm kir, Mero-
dak bêzar bû; kevirên wê yî çi-
kandî şerm kirin, pûtên wê bêzar
bûn! bibêjin. 3 Ji ber ku li dijî wê
ji bakurê neteweyek derdikeve,
dê warê wê wêran bike û dê yê ku
tê de rûnê tune be; mirov jî hey-
wan jî reviyan û çûn. 4 Di wan ro-
jan de, di wê wextê de, XUDAN
dibêje, lawên Îsraêl, ew û lawên
Cihûdayê dê pev re werin; dema
bimeşin dê bi girî herin û li Xwe-
dayê xwe XUDAN bigerin. 5 Bi
gotina: Werin, bi XUDAN re bi
peymana abadîn ve yek bibin!
wecê wan li berbi Siyonê dê rêya
wî bipirsin.
6 Netewa min mîhên ku winda
bûyine ne; şivanên wan, wan çewt
kirin; li çiyan wan berdan, ji çiyê
çûn girê; cîhên ku lê radiketin ji
bîr kirin. 7 Hemûyên ku mîhan
dîtin wan xwarin û neyarên wan
gotin: Em ne bisûc in, ji ber ku li
dijî XUDAN, ji welatê rastiyê re,
li dijî XUDANê ku hêviya bapîrên
wan bû, wan sûc kirin! 8 Ji hundirê
Babîlê birevin û ji welatê Kildani-
yan derkevin û li pêşiya keriyan
bibin mîna nêriyan! 9 Ji ber ku a
vay, li dijî Babîlê civaka netewe-
yên mezin, ji warê bakurê ve ez ê
hişyar bikim û derxînim û dê li dijî
wê rêz bibin; dê ji wî alî ve bête
stendin; dê tîrên wan bibin mîna
tîrê egîdê bihuner; qet yek ji wan
dê vala venegerin. 10 Û dê welatê
Kildaniyan bibe malê talanê;
hemûyên ku talana wê rakin, dê têr
bibin! XUDAN dibêje.

*Têkçûna Babîlê*

11 Madem ku hûn kêfxweş dibin,
madem ku bi şabûnê ve dicoşin, ya
hûn, ên ku mêrasa min talan dikin,
madem ku hûn mîna çêleka ciwan
ya ku li bênderê gêrê dike dipen-
gizin û mîna bergîran dişeyin;
12 dê dayikên we zehf şerm bikin;
dê wecê yê ku we anîne dinê sor
bibe; a vay, dê dawiya netewe-
yan bibe çol û warê ziwa û tenha!
13 Ji ber hêrsa XUDAN dê kesî ku
lê rûnê tune be, lê bitûmî bitûmî
dê tenha bimîne; hemûyên ku ji
Babîlê derbas bibin, dê şaş bimînin
û dê ji ber asîwên wê bifikînin.
14 Ya hûn, hemûyên ku kevanê
dikişînin! Li dijî Babîlê li hember
dorê rêz girê bidin; tîr bavêjin wê û
tîrê neparêzin! Ji ber ku li dijî XU-
DAN sûc kir. 15 Li hember dora
wê li dijî wê biqêrin! ew radest bû;
bircên wê ketin, dîwarên wê xera
bûn; ji ber ku tola XUDAN e; ji wê
tolê hildin; wê çi kiribe, bi vî awayî
lê bikin! 16 Yê ku zad diçîne û di
dema çinandinê de dasvan ji Babîlê
jê bikin û bavêjin! dê ji ber şûrê te
yî xedar her kes vegere netewa xwe
û dê her kes bireve welatê xwe.

*Vegera Îsraêlê*

17 Îsraêl mîhê belavbûyî ye; şêran

wê revandin; pêşiyê qiralê Asûrê
wê xwar; niha jî qiralê Babîlê
Nebûkadnetsar di ya dawiyê de
hestiyên wê şikand. 18 Ji ber vê
yekê Xwedayê Îsraêlê, XUDANê
artêşan wusa dibêje: A vay, çawa
sehêtiyê li qiralê Asûrê kiribim,
ez ê bi vî awayî sehêtiyê li qiralê
Babîlê û li welatê wî jî bikim. 19 Û
ez ê Îsraêlê dîsa bînim çêregeha wê
û dê li Karmelê û li Başanê biçêre û
dê li çiyayiya Efrayîmê û li Gîleadê
canê wê têr bibe. 20 Di wan rojan
de û di wê wextê de, XUDAN
dibêje, dê li fesadiya Îsraêlê ve
bête gerîn û dê fesadiya wê tune be
û dê li sûcên Cihûdayê bête gerîn
û dê neyê dîtin; ji ber ku ez ê ji zi-
lamên ku wan bi mawetî hiştibûm
bibexşînim.
21 Li dijî welatê Merataîmê, li dijî
wê û li dijî yên ku li Pekodê rû-
dinin derkeve; bukuje û ji pêy wan
bitûmî bitûmî tune bike, XUDAN
dibêje û li gor her tiştên ku ji te
re emir kirime, bike! 22 Li welêt
welwela ceng û şikestina mezin!
23 Çakûcê hemûya dinê çawa
şikest û perçe bû! Babîl di nav
neteweyan de çawa bû wêrane!
24 Bona te dafikê danîm, ya Babîl,
tu jî bi nezanî ket wê; tu hate dîtin
û him jî ketê, ji ber ku te li dijî XU-
DAN cengê kir. 25 XUDAN xe-
zîneya xwe vekir û çekên xezeba
xwe derxist; ji ber ku li welatê Kil-
daniyan karê ku dê Xudanê artêşan
XUDAN bike heye. 26 Ji her alî ve
li dijî wê werin! Embarên wê vekin;
mîna komelan wê kom bikin, wê
bitûmî bitûmî tune bikin; bila ji wê
tu tiştek nemîne! 27 Hemû ganêrên
wê serjê bikin; bila ji serjê kirinê re
dakevin! Wey li serê wan! Ji ber ku
roja wan, wexta sehêtî kirina wan
hat! 28 Bona ku tola Xwedayê me
XUDAN, tola perestgeha wî li Si-
yonê bidin bang kirin, dengê yên
ku ji warê Babîlê ve reviyane û xe-
las bûyîne!
29 Tîrvanan, hemûyên ku kevanê
dişidînin bangî li dijî Babîlê bikin!
û li hember dora wê artêşgehê
deynin; bila tu kes ji wir nereve
û xelas nebe! li gor karê wê bidin
wê; her çi kiribe, li gor wê jê re
bikin, ji ber ku li dijî XUDAN, li
dijî pîrozê Îsraêlê bi kubir bû! 30 Ji
ber vê yekê, dê xortên wê di qadên
wê de bikevin û hemû mêrên wê
yên cengê dê wê rojê bên kuştin[1]!
XUDAN dibêje. 31 Ya tu, yê ku
bi kubr e, a vay, ez li dijî te me,
Xudanê artêşan XUDAN dibêje;
ji ber ku roja te, wexta ku ez ê
sehêtiyê li te bikim hat. 32 Û yê
ku bi kubr e dê biçerixe û bikeve
û dê yê ku wî rake tune be û ez ê
agir di bajarên wî de pêbixim û dê
hemûyên ku li dora wê ne, bixwe
û biqedîne.
33 XUDANê artêşan wusa dibêje:

1 Bên bêdeng (hiş) kirin.

Lawên Îsraêl û lawên Cihûdayê,
her du jî mexdûr bûn û hemûyên
ku wan sirgûn kirine, hijdîn bi
wan ve digirin; naxwazin ku wan
berdin. 34 Xelaskerê wan xwurt e;
navê wî XUDANê artêşan e; bona
ku yên li Babîlê rûdinin bilerizîne
û rehetiyê bide dinê, dê doza wan
bitûmiya wê bibîne. 35 Li ser Kil-
daniyan û li ser yên ku li Babîlê
rûdinin û li ser serokên wê û li
ser zanyariyên wê şûr! XUDAN
dibêje. 36 Li ser yên ku bi vala-
hiyê pesin didin şûr û dê ew bibin
dîwane! Li ser egîdên wê jî û dê
ew ê bêzar bibin! 37 Li ser hespên
wan û li ser erebeyên wanî cengê
û li ser hemûya neteweya tevlihev,
ya di nav wan de ne şûr û dê ew ê
bibin mîna pîrekê; li ser xezîneyên
wan şûr û ew ê werin talan kirin!
38 Li ser avên wan ziwayî! Û dê
ew ê ziwa bibin, ji ber ku ew warê
pûtên qewartî ye û bi pûtên xwe
ve har bûn. 39 Ji ber vê yekê dê
cenawirên çolê, tevî guran li wir
rûnin û dê heştirme li wir rûnin û
êdî abadîn dê li wir neyê rûniştin
û ji nifşe heta nifşê kesî ku tê de
rûnê, dê tune be. 40 Mîna ku dema
Xwedê Sodom û Gomorayê û ba-
jarên cîranên wê bi ser û binî kirin,
dê tu kes li wir rûnenên û dê mi-
rov li wir nebe mêvan, XUDAN
dibêje.
41 A vay, ji bakur ve neteweyek tê
û dê neteweyek mezin û pirr qiral ji
nîçikên erdê ve hişyar bibin. 42 Di
destên wan de kevan û rim hene;
bêînsaf in û dilovaniya wan nîne;
dengên wan mîna behrê digurme û
li hespan siwar bûne, her yek mîna
cengawerê ku li dijî te rêzbûne,
ya qîza Babîlê. 43 Qiralê Babîlê
agahiya wan bihîst û destên wî sist
bûn; mîna pîreka ku tengasiyê di-
welidîne, janê bi wî girt. 44 A vay,
neyar li dijî welatê xwurt mîna şêr
dê ji nepixa Urdunê ve derkeve; ji
ber ku ez ê wan nişka ve ji wir bi-
revînim; her kî bête bijartin ez ê wî
deynim ser wan; ji ber ma yê ku
mîna min e, kî ye? Û yê ku dozê
li min veke, kî ye? Û şivanê ku dê
li pêşiya min bisekine, kî ye? 45 Ji
ber vê yekê biryara XUDAN ya
di derheqê Babîlê de û fikrên wî,
yên di derheqê warê Kildaniyan de
ne guhdarî bikin: Bi rastî dê wan,
biçûkê keriyên wan jî bajo; rastî,
dê welatê wan li ser wan xera bike!
46 Ji welwela stendina Babîlê din-
ya dilerize! û di nav neteweyan de
qêrîn tête bihîstin.

51 XUDAN wusa dibêje: A
vay, ez ê li dijî Babîlê û
li dijî yên ku li Leb-Kamaydayê
rûdinin bayekî helaq dike hişyar
bikim. 2 Û ez ê yên ku bênderê
ber ba dikin bişînim Babîlê û dê
wê ber ba bikin û dê welatê wê
vala bihêlin; ji ber ku dê di roja
xerab de ji her alî ve werin ser

wê. 3 Bila tîrvan li dijî yê ku ke-
vana xwe dikişîne û li dijî yê ku
bi zirxê xwe ve pesnahiya xwe
dide kevana xwe bişidîne û xortên
wê neparêzin; tim bitûmî bitûmî
artêşa wê tune bikin! 4 Û yên ku
hatine lêxistin dê li welatê Kilda-
niyan û birîndar dê di qadên wê
de bikevin!
5 Ji ber, yên çawa ku li dijî Pîrozê
Îsraêlê welatên wan bi sûc ve tijî
ne, dîsa jî Îsraêl û Cihûda ji aliyê
Xwedayê xwe ve, ji aliyê XU-
DANê artêşan ve nehatine ber-
dan. 6 Ji nava Babîlê birevin, bila
her kes canên xwe xelas bikin;
di hundirê fesadiya wê de helaq
nebin! Ji ber ku dema tolhildana
XUDAN e; yê ku dê li dijî wê bide
ew e. 7 Babîl di destê XUDAN de,
bû tasekî zêrîn ya hemûya dinê
serxweş dike; neteweyan ji xem-
ra wê vexwarin; neteweyan ji ber
vê yekê har bûn. 8 Babîl nişka ve
ket û şikest; bona wê biûrin! Bona
jana wê merhemê bistînin! dibe
ku şîfayê bibîne! 9 Me xwest ku
şîfayê bidin Babîlê, lê belê şîfayê
nedît; wê berdin û em herin, her
kes bila vegerin welatê xwe; ji ber
ku daraziya wê digihêje ezmanan
û bilindî ezmanê bû! 10 XUDAN
rastiya me derxist qadê; werin ku,
em karê Xwedayê xwe XUDAN
li Siyonê bibêjin!
11 Tîrikan tûj bikin, bi hijdîn bi
mertalan bigirin! XUDAN ruhên
qiralên Medan hişyar kir; ji ber
bona ku Babîlê helaq bike, mirazê
wî li dijî wê ye; ji ber ku ev tola
XUDAN e, tola perestgeha wî
ye. 12 Li hemberî dîwarên Babîlê
alan biçikînin, qereqolê xwurttir
bikin, notirvanan deynin, kemînan
bavêjin! Ji ber ku XUDAN li dijî
yên ku li Babîlê rûdinin, him nêt
kir, him jî gotina xwe kir. 13 Ya
tu, yê li ser pirr avan rûdinê, yê ku
bi zêdeyî xezîneyên wî hene, da-
wiya te hat, olçega qezenca te yî
xerab tijî bû! 14 XUDANê artêşan
li ser xwe sondê da: Bi rastî mîna
ku bi kulliyan ve dagirim ez ê te bi
zilaman ve dagirim û dê li dijî te
qêrînên serfiraziyê bavêjin!

*Ji XUDAN re Pesnahî*

15 Bi quweta xwe erdê afirand,
bi zanyariya xwe dinê zeximand
û bi fêhmkariya xwe ezmanan
şidandin. 16 Dema ew deng bide,
li ezmanan av digurme û ji nîçikên
erdê ve hêlman bilind dike; bona
baranê birûskan diçerqîne û ji xe-
zîneyên xwe bayê derdixe. 17 Dê
hemû mirov tevî zanîna xwe bibin
xêvik û her zêrînger ji pûtê xwe yî
qewartî şerm bike; ji ber ku pûtê wî
yê rijandî derew e û di wan de hilm
nîne. 18 Tunebûnek in, karê xapan-
dinê; dê di dema sehêtîbûna xwe de
winda bibin! 19 Para Aqûp ne mîna
wan e; ji ber ku yê şiklê dide her
tiştî ew e û Îsraêl ezbeta mêrasa wî

ye; navê wî XUDANê artêşan e.
20 Tu doqika min û çekên minî
cengê ne û ez ê bi te neteweyan
bişikînim û ez ê bi te welatan he-
laq bikim 21 û ez ê bi te hespê
û siwarê wê bişikînim 22 û ez ê
bi te erebeya cengê û siwarê wê
bişikînim û ez ê bi te mêr û pîrekê
bişikînim û ez ê bi te zilamê ka-
lepîr û xort bişikînim û ez ê bi te
zilamê ciwan û qîza ku neçûye
mêr bişikînim 23 û ez ê bi te
şivan û keriyê wî bişikînim û ez
ê bi te cotkar û cota wî bişikînim
û ez ê bi te waliyan û qeymiqay-
man[1] bişikînim. 24 Û ez ê hemû
xerabiya ku li Siyonê li ber çavên
we kirine, ji hemûyên ku li welatê
Babîlê û Kildaniyan rûdinin re bi-
dim, XUDAN dibêje.
25 Çiyayê ku helaq dike! Tu ku,
hemûya dinê helaq dike, XU-
DAN dibêje, a vay, ez li dijî te
me û ez ê destê xwe dirêjî ser te
bikim û ez ê te ji zinaran ber bi
jêr bigindirînim û ez ê te bikim
çiyayekî şewitî. 26 Û dê ji te
kevirê quncîkê û kevirê bingehê
ranehêjin; lê belê tuyê bibe wêra-
neyek abadîn, XUDAN dibêje.
27 Li welêt alê biçikînin, di nav
neteweyan de li boriyê bixin! Ne-
teweyan li dijî wê amade bikin, li
dijî wê bangî qiraletiyên Ararat,
Mînnî û Aşkenazê bikin; li dijî
wê serokek bi wezîfedar bikin;
hespên mîna kulliyên bipûrt
derxînin ser wê! 28 Neteweyan,
qiralên Medan, waliyên wê û
hemû qeymiqaymên wê û hemû
welatê ku di bin serweriya wan
de ne, li dijî wê amade bikin!
29 Û welat dilerize û jarînê dike;
ji ber bona ku warê Babîlê bike
wêraneyek tena, fikrên XUDAN
ên li dijî Babîlê ne, li cîhê xwe
disekinin. 30 Egîdên Babîlê des-
tên xwe ji ceng kirinê kişandin,
di bircên xwe de rûdinin; quweta
wan çikiya; bûn mîna pîrekê; agir
bi şunwarên wê ve hate dadan;
çilmêreyên deriyên wê şikestin!
31 Û bi gotina ku: Bajarê wê ji
her alî ve hate stendin û bihurk
hatin girtin û qamirgeha wan hate
şewitandin û mêrên cengê şaş
û metal man, 32 bona ji qiralê
Babîlê re bighînin, şandî ji bo
rastî şandî bibe û nûçevan[2] rastî
nûçevan bibe dê bazdin.
33 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê,
XUDANê artêşan wusa dibêje:
Dema gêrê cîhê bênderê çawa be,
qîza Babîlê jî wusa be; hinekî din
jî; dê bona wê jî dema dasê were!
34 Qiralê Babîlê Nebûkadnetsar
min xwar, min eciqand, min kir
feraxekî vala, mîna cenawir min
daqurtand, bi xwarinên minî xweş
zikê xwe dagirt; min qewirand.

[1] Ser navçeyan.

[2] Agahîgîhan.

35 Yê li Siyonê rûdinê, dê bibêje:
Zordestiya ku li min û li goştê
min ve hatiye kirin, bila di histuyê
Babîlê de be! Û dê Orşelîm bibêje:
Bila xwîna min di histuyê yên ku li
welatê Kildaniyan de rûdininê be.
36 Ji ber vê yekê XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê doza te bibînim
û ez ê tola te hildim û ez ê behra
wê ziwa bikim û ava çavkaniya
wê bibirim. 37 Û dê Babîl bibe
komikên keviran, cîhê çeqel, dê
bibe tiştekî ku şaş dike û lê fîkan-
din tête kirin, dê tu kesê ku lê rûnê
tune be. 38 Dê mîna şêrên ciwan
gişt pev re bigurmin; mîna çêlika
şêran dê kufkufê bikin. 39 Dema
ew bixeyidin, ez ê ziyafetên wanî
vexwarinê[1] bikim û bona ku bila
bi şabûnê ve bicoşin û bila bike-
vin xewa abadîn û hişyar nebin ku
ez ê wan serxweş bikim, XUDAN
dibêje. 40 Ez ê wan mîna berxi-
kan, mîna nêrî û beranan daxînim
serjê kirinê.

*Dawiya Babîlê*

41 Şeşak çawa hate stendin! Û
ya ku hemûya dinê pê re pesna-
hiya xwe dida çawa ket dest! Di
nav neteweyan de Babîl çawa bû
wêrane! 42 Behr bi ser Babîlê
girt; zêdebûna şepêlên wê, wê nu-
xumand. 43 Bajarên wê bû wêra-
ne, cîhekî ziwa û çol û welatekî
ku tu kes lê rûnanê bû û lawê mi-
rov ji wir derbas nabe. 44 Û ez ê li
Babîlê sehêtiyê li Bel bikim û ya
ku daqurtandiye, ez ê ji devê wê
derxînim û êdî dê netewe berbi
wê ve neherikin; belê, dê dîwarê
Babîlê bikeve.
45 Ya netewa min, ji hundirê wê ve
derkevin û bila her kes ji hêrsa XU-
DAN ya sor canê xwe xelas bike!
46 Û dema salek agahiyek û doti-
ra salê agahiyek din were û dema
li welêt zordestî bibe, dema serwer
li dijî serwer rabe, bila dilê we la-
waz nebe û ji agahiya ku dê li welêt
bête bihîstin metirsin! 47 Ji ber vê
yekê, a vay, rojên ku ez ê sehêtiyê li
pûtên qewartî yên Babîlê bikim tên
û dê hemû warê wê şermezar bibe
û hemûyên wê yî hatine kuştin, dê
bikevin nava wê. 48 Û li ser Babîlê
ezman û erd û hemûyên ku di wan
de ne, dê bi kêfxweşiyê bistirên; ji
ber ku dê ji bakur ve helaqkir werin
ser wê, XUDAN dibêje. 49 Babîl
çawa lêxistiyên Îsraêlê xistibe,
lêxistiyên hemûya welat jî dê li
Babîlê wusa bikevin.
50 Ya hûn, ên ku ji şûr ve reviyane
û xelas bûne, herin, nesekinin! Ji
dûr ve bîranîna XUDAN bikin û
bila Orşelîm were bîra we! 51 Me
şerm kir, ji ber ku gazincan bihîs-
tin, ruswaytî wecê me girt; ji ber
ku yên biyan ketin cîhên pîroz ên
Perestgeha XUDAN. 52 Ji ber vê
yekê, a vay, rojên ku ez ê sehêtiyê li

---

1 Araqê.

pûtên wê yî qewartî bikim tên, XU-
DAN dibêje û dê di hemûya welatê
wê de birîndar binalin. 53 Babîl
hilkişe ezmanan jî, bilindahiya
quweta xwe bizexmîne jî, dê dîsa
ji aliyê min ve helaqkir werine wê,
XUDAN dibêje.
54 Ji Babîlê ve qêrîn û ji welatê
Kildaniyan dengê şikestina mezin!
55 Ji ber ku XUDAN Babîlê helaq
dike û ji hundirê wê ve dengê me-
zin bêdeng dike; lehiyên wê mîna
gellekî avan digurmin; şemateya
dengên wan derdikeve; 56 ji ber
ku helaqkir hate ser wê, ser Babîlê
û egîdên wê hatin stendin, ke-
vanên wan perçe perçe bûn, ji ber
ku XUDAN, Xwedayê berdêlan
e, helbet ku dê berdêla wê bide!
57 Û ez ê serokên wê û zilamên
wê yî bi zanyarî, walî û qeymi-
qaymên wê û egîdên wê serxweş
bikim û dê bikevin xewa abadîn
û hişyar nebin, Qiral dibêje, navê
wî, XUDANê artêşan e. 58 XU-
DANê artêşan wusa dibêje: Dê
dîwarên Babîlê ên fireh bitûmî
bitûmî xera bibin û deriyên wê yî
bilind bên şewitandin û dê netewe
bona tiştê vala kedê bikişînin û dê
keda gelan ji agir re bikêr bê û dê
westayî bikevin!
59 Di sala çaremîn ya qiraletiya
Tsedekiyayê qiralê Cihûdayê de,
Serayayê lawê Neriyayê, lawê
Mahseya dema bi Tsedekiya re
çû Babîlê, gotina ku Yêremya
peyxamber jê re emir kiriye. Se-
raya ser navber bû. 60 Û hemû
xerabiya ku dê were ser Babîlê
û Yêremya hemû van gotinên ku
bona Babîlê hatine nivîsandin, li
pirtûkekê nivîsand. 61 Û Yêrem-
ya ji Seraya re got: Dema tu bi-
gihêje Babîlê binêre û hemû van
gotinan bixwîne 62 û bibêje: Ya
XUDAN, li vê derê ne zilam, ne
heywan, bila yê ku rûnê tune be,
lê belê bona ku bibe wêraneyek
abadîn, ji bo tu wê jêke û bavêje
te got! 63 Û dê wusa bibe ku,
dema tu xwendina vê pirtûkê bi-
qedîne, tuyê kevirekê pê girê bide
û tuyê wê bavêje nava çemê Fe-
ratê 64 û tuyê bibêje: Dê Babîl jî
bi vî awayî noq bibe[1] û ji ber bela-
ya ku ez ê bînim ser wê carekî din
dê ranebe û ew ê westayî bikevin!
Gotinên Yêremya heta vê derê ye.

*Têkçûna Orşelîmê*

2.Qir 24,18-20; 25,1-21; 2.Dîr 36,11-21;
Yêr 39,1-10

52 Dema Tsedekiya bû qi-
ral bîst û yek salî bû û li
Orşelîmê yanzdeh sal qiraletiyê
kir û dayika wî qîza Yêremyayê
Lîbnayî bû û navê wê Hamûtal bû.
2 Û li gor her tiştên ku Yehoya-
kîm çêkiriye, ya ku di çavê XU-
DAN de xerab e kir. 3 Ji ber ji bo
hêrsa XUDAN, heta ku wan ji ber

1 Bixewire, têk biçe, an jî: Binav bibe.

çavê xwe ve avêtin li Orşelîmê û
Cihûdayê wusa bû.
Û Tsedekiya li dijî qiralê Babîlê asê
bû. 4 Û wusa bû ku, di sala nehemîn
ya qiraletiya xwe de, di meha
dehan de, di roja dehan ya mehê
de, qiralê Babîlê Nebûkadnetsar,
ew bi xwe û hemûya artêşa wî,
hate ser Orşelîmê û li hemberî
wê artêşgehê ava kir û li dijî wê
li hember dorê meterîsê çêkirin.
5 Û heta sala yanzdehan di ya qiral
Tsedekiya de bi hember dorên
bajêr ve girtin. 6 Di meha çaremîn
de, di roja nehemîn ya mehê de, li
bajêr xela dijwar bû û bona netewa
welêt nan tunebû. 7 Û di dîwarên
bajêr de qul vebûn û hemû mêrên
cengê reviyan û ji rêya derî ya di
bexçeyê qiral de ye û di nav du
dîwarî de ye şev ji bajêr ve derketin
û Kildaniyan bi dor û ber li hemberî
bajêr bûn û ji rêya Arabayê ve çûn.
8 Lê belê artêşa Kildaniyan bera
pêy qiral da û di deştên Erîhayê
de gîhaştin Tsedekiya û hemûya
artêşa wî ji cem wî ve belav bûn.
9 Û bi qiral ve girtin û wî hilkişandin
Rîblayê ya ku li warê Hamatê ye,
cem qiralê Babîlê û di derbarê wî de
darazî da. 10 Û qiralê Babîlê lawên
Tsedekiya li ber çavên wî kuşt û
hemû serokên Cihûdan jî li Rîblayê
kuşt. 11 Û çavên Tsedekiya kor kir
û qiralê Babîlê wî li zincîrê xist û
wî bir Babîlê û heta roja mirina wî,
wî di girtîgehê de hişt.

12 Sala nozdehan ya qiralê Babîlê
Nebûkadnetsar bû û di meha pên-
can de û di roja dehan ya mehê
de, Nebûzaradanê serokê leşkerên
parêzger, ê ku li ber qiralê Babîlê
disekinî ket Orşelîmê. 13 Û mala
XUDAN û mala qiral şewitand û
agir bi hemû xaniyên Orşelîmê ve,
bi her xaniyê mezin ve xist. 14 Û
hemûya artêşa Kildaniyan ya li
cem serekê leşkerên parêzger in, bi
dor û ber hemû dîwarên Orşelîmê
xera kirin. 15 Û Nebûzaradanê se-
rokê leşkerên parêzger, ji yên ku
ji xizanên netewê ne û jibermayi-
yên netewê ên ku li bajêr ve hatine
hiştin û revokên derbasî aliyê qiralê
Babîlê bûne û ji bermayiyên gel sir-
gûn kirin. 16 Lê belê Nebûzaradanê
serokê leşkerên parêzger wekî rez-
van û cotkaran, qismek ji xizanên
welêt ve hişt.
17 Û sitûnên tûnc ên li mala XU-
DAN bûn û pêldankên li mala XU-
DAN bûn û behra tûnc Kildaniyan
perçe kirin û hemû tûncên wê birin
Babîlê. 18 Û qazanên ku di xiz-
metê de dihatin bikaranîn û bêran
û meqesan û leganan û kevçiyan û
hemû feraxên tûnc rahiştin û birin.
19 Û serokê leşkerên parêzger qe-
dehan û tebleyan û leganan û qa-
zanan û şimadankan û kevçiyan û
tasan, zêra ku zêr e û zîvê ku zîv e,
rahişt û bir. 20 Tûncê du sitûnan û
ya behrekê û ya donzdeh ganêrên
tûnc ên ku di bin lingdankan de

bûn, vana yên ku qiral Silêman
wan bona mala XUDAN çêkiribû,
tûncê hemûyên van taximan ne di-
hatin weznê. 21 Û dema em werin
situnan, dirêjiya sitûnekî donzdeh
gez[1] bû û tayekî donzdeh gezî dor
lê digirt û qalindiya wê çar tilîk[2]
bû; hundirê wê vala bû. 22 Û li
ser wê seriyekî tûnc hebû û bilin-
dahiya seriyekî pênc gez bû û li
ser vî seriyî gişt ji tûncê, karê tor
û hinaran hebû û sitûna duwem
û hinarên wê jî wusa bû. 23 Û li
kêlekên wê nod û şeş hinar hebûn;
li hember dorê li ser torê hemûyên
hinaran sed heb bûn.
24 Û serokê leşkerên parêzger, se-
rokkahîn Sereya û kahînê duwem
Tsefanya û sê notirvanên şêmûgê
rahişt 25 û ji bajêr karmendek, ê
ku li ser mêrên cengê ve hatiye
danîn û ji yên ku wecê qiral dîtine,
ên li bajêr in heft kes û nivîskarê
serokê artêşê, ê ku netewa bajêr ji
leşkeriyê re dinivîsîne û ji netewa
welêt ên ku di hundirê bajêr de
ne, şêst kesî rahişt. 26 Û Nebû-
zaradanê serokê leşkerên parêz-
ger wan rahişt û bir Rîblayê, cem
qiralê Babîlê. 27 Û qiralê Babîlê
li wan xist û li welatê Hamatê, li
Rîblayê wan kuşt. Û Cihûda ji axa
xwe ve hate ajotin.
28 Netewa ku Nebûkadnetsar wan
ajotiye ew e: Di sala heftemîn
de sê hezar û bîst û sê Cihûd;
29 di hîjdeh saliya Nebûkadnetsar
de ji Orşelîmê heyşt sed û sîh
û du can ajot, 30 di bîst û sê
saliya Nebûkadnetsar de, ên ku
Nebûzaradanê serokê leşkerên
parêzger ji Cihûdiyan ve ajotiye
heft sed û çel û pênc can; hemûyên
canan çar hezar û şeş sed (bûn).

### *Qiral Yehoyakîn serbest tête berdan*

2.Qir 25,27-30

31 Û di sîh û heft sala sirgûntiya
Yehoyakînê qiralê Cihûdayê de,
di meha donzdehan de, di roja
bîst û pêncê ya mehê de wusa bû
ku, qiralê Babîlê Evîl-Merodak,
di sala yekemîn ya qiraletiya xwe
de serê qiralê Cihûdayê Yeho-
yakîm bilind kir û wî ji hepsê ve
derxist 32 û jê re tiştên qenc got
û texta wî ji textên qiralên ku li
Babîlê bi wî re ne, jortir danî
33 û kincê wî yê girtîgehê guhert.
Û Yehoyakîm di tûmiya rojên te-
mena xwe de li ber wî nan dixwar
34 û ji aliyê qiralê Babîlê ve jê re
zewêdeyek[3] dayîmî, di rojên te-
mena wî de her roj, heta roja mi-
rina wî wekî zewêda wî be jê re
parek dihat dayîn.

[1] Li rasteka menan binêrin.
[2] Li rasteka menan binêrin.
[3] Xwarina wî ya rojane, an jî: Tayîn.

# LAWIJÊN YÊREMYA

*Pêşgotin*

Pirtûka Lawijan B.Z. di 586'an de ji pênc lawijên li ser têkçûna Orşelîmê, li ser sirgun û dawiya vê têkçûnê hatine gotin, pêk tê. Çar birrên pêşîn ên pirtûkê bi awayê akrostîşê hatine nivîsandin. Ayet bi dorê, bi tîpên elîfba ya Îbraniyan destpê dike. Tenê di birra sêwemîn de her sê ayet bi yek tîpî dest pê dikin. Çawa ku pirtûk bi giştî, bi awayek şînê ye, lê dîsa jî hêviya ji hatinê re û ewleyiya ji XUDAN re jî tête dîtin. Lawij, bona bîranîna bêtariya netewî ya ku Îsraêliyan B.Z. di sala 586'an de dîtine, ji aliyê Cihûdan ve her sal, di şîna ku dikevinê û di rojên rojiyê de, di peristinê de têne bikar anîn.

*Xetên Bingehîn:*


| | |
|---|---|
| 1:1-22 | Êşên Orşelîmê |
| 2:1-22 | Cezaya Orşelîmê |
| 3:1-66 | Ceza û hêvî |
| 4:1-22 | Orşelîm vedigere vîranxaneyê |
| 5:1-22 | Dua ku bona dilovaniyê tête kirin |


*Lawija Yekem*

1 Ew bajarê ku, bi gel ve tijî
bû, çawa tena xwe rûdinê! Di
nava netewan de mezin bû, bû
mîna jinebiyê! Di nava serbajaran
de mîna mîrêyek bû, bû yê ku xe-
racê dide!
2 Şevê bi êş û nalînê digirî û hês-
tirên wê, li ser lamên wê ne; ji
hemûyên hezkirên wê, xemre-
vînê wê nîne; hemû hevalbendên
wê xaîntiyê pê re kirin; bûn ne-
yarên wê.
3 Cihûda, bona cefakişandinê û
koletiyek giran bike çû sirgûnê;
di nava neteweyan de rûdine, cîhê
rehet nabîne; yên ku di tengasî-
yê de pêy wî diqewirandin, gişt
gîhaştin wî.
4 Rêyên Siyonê şînê dikişîne,
ji ber, kesekî ku tên cejnên bijartî
nîne; hemû deriyên wê tenha ne,
kahînên wê dinalin; qîzên wê,
yên ku neçûne mêr di aciziyê
de ne, ew jî bi xwe di nava janan
de ye.

5 Neyarên wê derbasî serî bûn,
karên dijminên wê di rê de ne; ji ber
ku ji zêdeyiya gunehên wê, XU-
DAN wê xist tengasiyê; zarokên
wê li ber neyar çûn sirgûnê.
6 Û hemû xweşikya qîza Siyon,
ji ser wê reviya; serokên wê bûn
mîna askên ku nikarin çêregehê
bibînin û li ber yê ku dawiyê di-
qewirîne, bêteqat dimeşin.
7 Orşelîm, hemû tiştên xwe yî
xweşik, yên ku di rojên wê yî
kevin de bûn, di rojên perîşanî û
cefê de, di bîra xwe de tîne. Dema
netewa wê, gava alîkarê wê tune
bû kete destê neyar,
neyaran wê dîtin, li têkçûna wê
keniyan.
8 Orşelîm sûcê giran kir; ji ber vê
yekê mindar bû; heçiyên ku wê
dihesibînin, wê biçûk dibînin, ji
ber ku tazîbûna wê dîtin; ew jî di-
nale û paşê xwe dizivirîne.
9 Mindariya wê di dawên wê de;
dawiya xwe di bîra xwe de neanî;
ketina wê yî jêr jî tiştekî ecêp kir
e; yê xemrevîniyê jê re dike nîne;
ya XUDAN, zebûniya min bibîne;
ji ber ku neyar bi kubrê ve ket!
10 Li ser hemû tiştên wê yî xweşik
re, neyar destê xwe dirêj kir; ji
ber, dît ku netewe ketin cîhê wê yî
pîroz, ew neteweyên ku, te bona
wan emir dabû ku, bila nekevin
civaka te!
11 Hemû netewa wê dinalin, li
nan digerin; bona ku canê xwe
xelas bikin[1], tiştên xweşik bi xwa-
rinê ve dan; ya XUDAN, binêre û
bibîne; ji ber ku ez perîşan bûm!
12 Ya hûn hemû, yên ku ji rê ve
derbas dibin, ma bona we ev ne
tiştek e? Qenc binêrin û bibînin,
ma derdek mîna derdê ku anî-
ne serê min heye? Ew derdê ku
XUDAN di roja hêrsa xwe yî sor
de, bi wê zehmetê bi min re da
kişandin.
13 Ji jor ve agir berda nava hes-
tiyên min û wan xwarin; bona
lingên min torê raxist, min paşverû
kir; min xopan kir, ez di hemûya
rojê de bîrçûyî me.
14 Nîrê gunehên min, bi destê wî
ve hate girêdan; ji wan honanek
çêkirin û bi stuyê min ve hatin
derbas kirin; hêza min çikand;
Xudan min da destê kesên ku
hêza min têra li hember wan seki-
nandinê nake.
15 Xudan di hundirê min de,
hemû zilamên min ên dijwar bi
tuneyî hesibandin; bona ku xor-
tên min bişikînin, civakekê bi ser
min ve bang kirin; Xudan, qîza
Cihûda ya ku neçûye mêr, wekî di
mahserê de eciqand[2].
16 Ez bi vana digirîm; çavê min,
çavê min hêstiran dirijîne; ji ber,
xemrevînkirê ku canê min aniye

[1] An jî: Bînin cîh.
[2] Cût.

cîh, ji min dûr e; lawên min xerab
bûne, ji ber ku neyar serfiraz bûn.
17 Siyon destên xwe vekiriye, lê
belê yê ku xemrevîniyê jê re bike
nîne; bona ku yên li dorê ne bi-
bin neyarên wî, XUDAN emir da
Aqûp; di nav wan de Orşelîm bû
tiştekî mindar.
18 XUDAN bi dad e; ji ber ku ez
li hember emrê wî bûm asê. Niha,
ya neteweno, hûn gişt guhdarî
bikin û derdê min bibînin! Qîzên
min ên ku hîn nezewicîne û xor-
tên min çûn sirgûnê.
19 Bangî yên ku ji min hez dikin
kirim, lê belê wan, min xapandin;
bona ku canê wan bête cîh, dema
li bajêr, ji xwe re li xwarinê dige-
riyan, kahîn û kalepîrên min, li
bajêr canê xwe dan.
20 Binêre, ya XUDAN; ji ber
ku tengasiya min heye! Xwîn
ji hundirê min ve diçe; dilê min
tevlîhev[1] bû; ji ber ku ez zehf asê
bûm; ji derve şûr min ji zarokên
min ve dike, li malê mîna mirinê.
21 Nalîna min bihîstin, lê dîsa jî
kesî ku xemrevîniyê li min bike
nebû! Hemû neyarên min bêtari-
ya[2] min bihîstin; ji ber ku te vêya
kiriye, bi şahiyê coşiyan; tuyê roja
ku te daye bihîstin bîne, dê ew jî
bibin mîna min.
22 Bila her xerabiya wan bête ber
te û te bona hemû gunehên min çi
bi min kiribe, li wan jî bike; ji ber
ku nalînên min gellek, dilê min jî
bîrçûyî ye.

*Lawija Duwem*

2 XUDAN di hêrsa xwe de, qîza
Siyonê bi ewrê tarî ve çawa
nuxumand!
Xweşikiya Îsraêlê ji ezmanan avêt
erdê û di roja hêrsa xwe de îskem-
la bin lingên xwe di bîra xwe de
neanî.
2 Xudan hemû welatên Aqûp
daqurtand, heyf li wan neanî;
kelehên qîza Cihûda bi xezeba
xwe xera kir; wan heta erdê da-
xist; qiraletî û serokantiyên wê
xera kir.
3 Bi hêrsa sor, hemû qiloçên Îs-
raêlê jêkir; ji ber neyar, destê xwe
yî rastê şunda vekişand
û mîna agirê bi pêt yê ku bi dor
û ber dixwe û diqedîne ve Aqûp
şewitand.
4 Mîna neyar kevana xwe danî,
destê xwe yî rastê rakir û mîna
neyar çik sekinî û hemûyên ku
bi çav ve xweş tên kuştin; hêrsa
xwe, mîna agirê sor bi ser çadira
qîza Siyonê ve rijand.
5 Xudan wekî bibe mîna neyar
bû; Îsraêlê daqurtand; hemû qes-
rên wê daqurtand, kelehên wê
xera kir û di qîza Cihûda de qêrîn
û hawarê zêde kir.

1 Bi serî û binî.
2 Felaket, an jî: Asîw.

6 Û çepera wê, mîna çepera bexçe
rakir û avêt; cîhê civandinê xera
kir; XUDAN li Siyonê cejna bi-
jartî û Sebtê da ji bîr kirin û bi
hêrsa xwe yî dijwar qiral û kahîn,
di çavê xwe de biçûk hişt.
7 Xudan pêşkêşîgeha xwe rakir û
avêt, ji cîhê xwe yî pîroz kerihî;
dîwarên qesra Orşelîmê da des-
tê neyaran; mîna roja bijartî ya
cejnê, wan di mala XUDAN de
galegalê kirin.
8 XUDAN nêt anî ku dîwarên
qîza Siyonê xera bike; ben lê
şidand, dêstê xwe ji xerakirinê ve
nekişand û ji meterîsê û ji dîwarê
re şînê da kişandin; her du jî bi
derd in.
9 Deriyên wê bi erdê ve çûn; zen-
dên deriyan şikand û tune kirin;
qiral û serokên wê, di nava gelên
ku zagonên wan nîne de ne; belê,
peyxamberên wan ji XUDAN ve
xewn û xeyalê nabînin.
10 Kalepîrên qîza Siyonê li erdê
ve rûniştine û bêdeng in; axê
avêtin ser serên xwe; cilikê[1] li
xwe kirin; qîzên Orşelîmê, ên ku
nezewicîne, serên xwe bi erdê ve
xwar kirin.
11 Bêyî hêstir rijandinê çavên min
diqedin, hundirê min xwîn dibe; ji
ber şikestina qîza netewa min ke-
zeba min bi erdê ve rijiya, ji ber
ku di qadên bajêr de zarok û yên
di pêsîrê de ne ji bîr ve diçin.
12 Dema li qada bajêr mîna birîn-
daran ji bîr ve çûn, dema canên
wan birijin sînga dayikên wan, ji
dayikên xwe re dibêjin: Ka xemr
û genim li ku derê ne?
13 Ma ez ji te re çi şahdeyiyê
bikim? Ya qîza Orşelîmê, ma ez
çi bikim mîna te?
Qîza Siyonê ya ku nezewiciye,
ma ez çi ji te re mînak bigirim ku
xemrevîniyê li te bikim?
Ji ber ku baxora di te de mîna behrê
mezin; ma dê kî şîfê bide te?
14 Bona te, peyxamberên te xewn
û xeyalên derewîn û bê mahne
dîtin û bona ku sirgûnên te şunda
vegerînin fesadiya te dernexistin
holê û bona te peyxamên derewîn
û yên ku dibin sirgûnê dîtin.
15 Hemûyên ku ji rê ve derbas
dibin, bona te çepikan lêdixin; ji
qîza Orşelîmê re seriyên xwe kil
dikin, difikînin û dibêjin: Ma ba-
jarê ku jê re digotin kêfxweşiya
hemûya dinê, gihiştiya[2] xweşikiyê
ev e?
16 Li dijî te hemû neyarên te devê
xwe vekirin; difikînin û diranan
diqîrçînin; dibêjin: Me wê daqur-
tandin; bi rastî, roja ku em li ben-
dê bûn ev roj e; me wê dîtin û lê
nihêrtin!

[1] Yanê çûl.

[2] Kemal.

17 XUDAN tiştê ku lê nêt anîbû,
kir; gotina ku di rojên berê de
emir kiribû, anî cîh; xera kir û
heyf lê neanî; li hember te neyarê
te kêfxweş kir; qiloçên neyarê te
bilind kir.
18 Dilên wan ji Xudan re feryadê
kir; dîwarê qîza Siyonê, bila bi
şev û roj, hêstirên te mîna lehi-
yê birijin; raneweste; bila bîboka
çavê te rehet neke!
19 Rabe, şevê di destpêka nobetan
de biqêre; dilê xwe mîna avekê li
ber wecê Xudan ve birijîne; bona
canê zarokên ku li serê her kuçeyê
ji birçîtiyê dixeriqin[1], destê xwe ji
wî re rake!
20 Binêre, ya XUDAN, bibîne!
Ma te kî wusa kir? Ma bila pîrek
berên xwe, zarokên ku di him-
bêzan de tên kişandin bixwin?
Ma qey bila kahîn û peyxamber
di cîhê herî pîrozê Xudan de bên
kuştin?
21 Di kuçeyan de zilamê xort û
kalepîr li ser axê radikevin; bi şûr
ve ketin, qîzên min ên ku neçûne
mêr û xortên min; te di roja hêrsa
xwe de wan kuşt, serjê kir, heyf li
wan neanî.
22 Te ji her alî ve bangî yên ku ez
ji ber wan bêzar im, kir; mîna rojek
cejnê[2] kes nebû ku di roja XUDAN
ya hêrsê de bireve, xelas bibe û ji
ber bimîne; neyarê min, zarokên
min ên ku di himbêzê de kişandime
û mezin kirime, qedandin!

*Lawija Sêwem*

3 Ez ew zilam im ku, ji çoyê xe-
zeba wî zehmetê kişandim.
2 Wî min ajot û ne di ronahiyê de,
di tariyê de da meşandin.
3 Bi rastî, di tûmiya rojê de dizi-
vire û destê xwe li dijî min dizi-
virîne.
4 Goştê min û hestiyê min dirand;
hestiyên min şikand.
5 Li hember min dîwar ava kir û
dora min bi tahlî û zehmetiyê ve
girt.
6 Mîna miriyên dema kevin di
cîhên tarî de min da rûniştandin.
7 Dîwar li dora min ve kişand û
ez nikarim derkevim, zengîra min
girantir kir.
8 Dema ez biqêrim û alîkariyê
bixwazim jî, bendekê li ber duayê
min ve dikişîne.
9 Bi kevirên qewartî ve dîwar
kişand rêyên min; rêyên min li
hev gerand.
10 Hirçek, ê ku bona min li kemînê
radikeve, şêrekî xwe veşartiye yî.
11 Rêyên min çewt kir û min pe-
ritand û min xerab kir.
12 Kevana xwe kişand û bona tîrê
min mîna nîşanekê danî.
13 Tîrên ku di kawdana xwe de
bû, li gurçikên min ve çikand.

1 Ji birçitiya ji bîr ve diçin.

2 An jî: Mîna rojek cejnê ya hatiye bijartin.

14 Ez ji hemûya netewa xwe re
bûm kenokî û di hemûya rojê de
ez sitrana wan im.
15 Min bi êşê ve têr kir, ava pelînê[1]
têra xwe bi min re da vexwartin.
16 Diranên min jî bi xîçan ve
şikand; min xist xweliyê.
17 Te canê min jî ji selametiyê ve
dûr xist; qenciyê ji bîr kirim.
18 Û gotim: Hêza min û ji aliyê
XUDAN ve hêviya min tune bû.
19 Zehmeta min û perîşaniya min,
gîhayê pelînê û ziravê di bîra xwe
de bîne!
20 Hîn jî canê min wan di bîra
xwe de tîne û di hundirê min de
xwar dibe.
21 Ez vêya tînim dilê xwe; ji ber
vêya hêviya min heye.
22 Ji xêra XUDAN e ku em helaq
nebûn, ji ber ku dilovaniyên wî
naqedin.
23 Ew her sibeh teze dibin, dilso-
ziya te mezin e.
24 Canê min dibêje ku: Para min
XUDAN e; ji ber vêya, ez hêviya
xwe bi wî ve girê didim.
25 Bona yê ku li benda wî ye,
bona canê ku lê digere, XUDAN
qenc e.
26 Hêvî kirin û bi bêdengiyê
li benda xelas kirina XUDAN
mayîn qenc e.
27 Bona mirov, di ciwantiya xwe
de nîr kişandin qenc e.
28 Bila tena xwe rûnê û bêdeng
be, ji ber ku wî (XUDAN) nîr xis-
tiye histuyê wî!
29 Bila devê xwe têxe axê, dibe
ku hêvî bibe.
30 Bila lamên xwe dirêjî kesê ku
dê lêxe bike, bila bi rezaletiyê ve
têr bibe!
31 Ji ber ku Xudan abadîn ji xwe
navêje[2].
32 Ji ber ku derd bide jî, li gor zê-
deyiya xêra xwe dilovaniyê dike.
33 Ji ber ku bi xwestekî zehmetê
nake û lawên mirov bi keser
nake.
34 Hemû hêsîrên dinê di bin lin-
gan de eciqandinê,
35 Li ber wecê Yê Bilind çewtki-
rina mafê mirov,
36 Di doza wî de neheqiyê li mi-
rov kirinê, Xudan rast nabîne.
37 Ma heta ku Xudan emir nede,
dê kî tiştekî bibêje û ew ê bête
cîh?
38 Ma qencî jî, xerabî jî ji devê
Yê Bilind dernakevin?
39 Ma mirov, zilamê ku hîn dijî,
çima giliyê cezayê sûcên xwe
dike?
40 Em lêkolînan li rêyên xwe
bikin û biceribînin û dîsa vegerin
XUDAN!
41 Ji Xwedayê ku li ezmana ye
re, tevî destên xwe, dilên xwe jî
bilind bikin!

[1] Gîhayê tahl.

[2] An jî: XUDAN qet kesekî abadîn ji xwe navêje.

42 Me guneh kir û em bûn asê; te
li me neborand.
43 Te bi hêrsê ve xwe nuxumand
û me qewirand; te bêmerhamet
me kuşt.
44 Te xwe bi ewrê ve nuxumand,
dua jê derbas nabe.
45 Te di nava neteweyan de me
kir gihûr û tiştekî qirêj!
46 Li dijî me, hemû neyarên me
destên xwe vekirin.
47 Ji me re toqîn û kortik, galegal
û şikestin bû.
48 Ji berya şikestina qîza netewa
min çavên min, hêstirên lehiyan
dirijînin.
49 Bêsekin, bêrawestin, çavê min
hêstiran dirijînin.
50 Heta ku XUDAN li jêr ve
nihêrt, ji ezmanan ve dît.
51 Ji berya hemû qîzên bajarê
min, êşa çavên min xwe berda
dilê min.
52 Yên ku bê sedem bûne neyarên
min, mîna civîkekê bi dijwarî
nêçîra min kirin.
53 Di sarincê de jiyana min helaq
kirin û keviran avêtin ser min.
54 Av ji ser serê min ve çûn[1], go-
tim: Ez qediyam!
55 Ji bin sarincê ve, bangî navê te
kirim, ya XUDAN.
56 Te dengê min bihîst; guhê xwe
ji banga min, ji hawara min re ne-
gire!
57 Roja ku bangî te kirim, tu nêzîk
hat, te got: Metirse!
58 Te dozên canê min dîtin, ya
Xudan; te jiyana min xelas kir.
59 Te neheqiya ku li min hatiye
kirin dît, ya XUDAN, mafê min
bike maf!
60 Te hemû tolhildan û hemû ra-
manên wan ên ku li dijî min in
dît.
61 Gazincên wan, ya XUDAN,
hemû fikrên wanî li dijî min,
62 Gotinên yên ku li ber min se-
kinîne û di tûmiya rojê de dek û
dolabên wanî li dijî min te bihîst.
63 Li rabûn û rûniştinên wan
binêre; ez bûm sitrana wan.
64 Tuyê li gor karê destê wan
berdêlê bidî wan, ya XUDAN!
65 Tuyê dilhişkiyê bidî wan; bila
naleta te li ser wan be!
66 Tuyê bi hêrsê ve berra pêy wan
bidî û wan ji bin ezmanên XU-
DAN ve helaq bikî û bavêjî!

*Lawija Çaremîn*

4 Zêr çawa mat bû[2]! Zêrê safî
çawa hate guhertin! Li serê
her kuçeyî kevirên cîhê herî pîroz
rijiyane!
2 Lawên Siyonê birûmet ên ku bi
zêrê safî ve hatine wezinandin,
çawa bû ku mîna karê destê kûz-
van, mîna kûzên axînî hatin hesi-
bandin!

---

1 Derbas kir.

2 Nabiriqî bû, an jî: Zenûn bû.

3 Heta çeqal jî guhanên xwe didin,
ji çêlikên xwe re didin mêtin; qîza
netewa min, mîna heştirmeyên li
çolê ne bû bêînsaf.
4 Ji tîbûnê zimanê zarokê mijokê,
bi polkeya wî ve dizeliqe; zarok
nan dixwazin, yê ku ji wan re hûr
bike nîne.
5 Ew ku, xwarinên qenc dixwarin,
li kuçeyan perîşan bûn; ew ku, li
ser erxewaniyê ve hatin mezin ki-
rin, komên zibilê hembêz kirin.
6 Bêyî dest lêxistinê, ji ber sûcê
Sodomê, wekî ku di derbikê de
xera bûbe, fesadiya qîza netewa
min hîn jî mezintir e.
7 Begên wê ji berfê ve paqijtir,
ji şîr ve sipîtir in; ji aliyê tenê ve
ji mercanê geweztir bûn, şiklên
wan, mîna yaqûta ezmanî bû.
8 Wecên wan ji komirê ve reştir
bûn; di kuçeyan de bûn ku neyên
naskirin; çermê wan bi hestiyên
wan ve zeliqî, hişk bû û bû mîna
êzingê.
9 Yên ku şûr wan kuştiye, ji yên
ku xela wan kuştine kêfxweştir
in; ji ber ku vana, ji tunebûna berê
zeviyê ve dihincirin û duhulin.
10 Pîrekên dilovan, bi destên xwe
ve zarokên xwe kelandin; ew di
şikestina qîza netewa min de ji
wan re bûn xwarin.
11 XUDAN di xeyda xwe de ser-
firaz bû, hêrsa xwe yî bi xeyd ri-
jand û agirê ku bingehên Siyonê
dixwe û diqedîne ji hundirê wê ve
pêxist.
12 Tu kes ji qiralên dinê û heçiyên
li dinê rûdiniştin bawer nedikirin
ku; dê neyar û dijmin ji deriyê
Orşelîmê ve bikevinê[1].
13 Ji ber sûcên peyxamberan, ji ber
fesadiyên kahîna ne; wan ku, di nava
bajêr de xwîna salihan rijandin.
14 Di kuçeyan de mîna koran di-
gerin, bi xwînê ve gemarî ne, ûsa
ku, kes destê xwe li kincên wan
naxe.
15 Bi gotina: Vekişin! ve bi wan
re qêriyan: Mindar! Vekişin!
Vekişin! Dest lê mexin!
Dema reviyan û mîna teralan geri-
yan, di nav neteweyan de: Bila êdî
li vir nebin mêvan! hate gotin.
16 Wecê XUDAN wan belav kir;
dê êdî li wan nenêre; kahînan ne-
hesibandin, ji kalepîran re keremê
nekirin.
17 Ev bi valahiyê bona xwe li ben-
da alîkariyekê ne, êdî çavên me di
çilmisandinê de ne; em hema li
benda neteweyek ku nikare me
xelas bikin man û man.
18 Şopên me dikewirînin, em ni-
karin di kuçeyên xwe de bigerin;
dawiya me nêzîk e, rojên me tijî
bûn; ji ber ku dawiya me hat.
19 Yên ku li pêy me diqewirînin ji
qertelên ezmanan ve çalaktir in; li
serê çiyan pêy me qewirandin; li
çolê kemînê ji me re danîn.

[1] An jî: Derbas bibin.

20 Hilma jiyana me, Mesîhê XU-
DAN, di kortika wan de hate gir-
tin; me bona wî digotin: Em ê di
nava gelan de, di siya wî de bijîn!
21 Qîza Edomê ya ku li warê Ûtsê
ve rûdine, ji şabûnê ve bicoşe û
kêfxweş bibe! Dê kase ji te re jî
were; tuyê serxweş bibî û xwe
tazî bikî.
22 Qîza Siyonê dawiya ceza fesa-
diya te hat! dê carekî din te nebe
sirgûnê; qîza Edomê, dê li fesa-
diya te binêre; sûcên te derxîne
holê.

*Lawija Pêncemîn*

5 Ya XUDAN, tiştê ku hatiye
serê me, di bîra xwe de bîne!
Binêre û şermezariya me bibîne!
2 Mêrasa me derbasî biyanan bû,
xaniyên me derbasî xerîban.
3 Em bûn sêwî, bav nîne; dayikên
me mîna pîrekên bî ne.
4 Me zîv dan û ava xwe vexwa-
rin; êzingê me bi pera tên.
5 Yên ku me diqewirînin li patika
me ne; em westayî ketin, ji me re
aramî nîne.
6 Bona ku bi nan ve têr bibin, me
destên xwe dirêjî Misir û Asûrê
kirin.
7 Bavên me sûcê kirin û êdî ew nîn
in; me fesadiyên wan hilgirtin.
8 Di ser me de kole serweriyê da-
jon; yê ku ji destê wan xelas bike
nîne.
9 Ji ber şûrê li çolê yî, em nanên
xwe bi buhayiya canê xwe bi dest
ve dixin.
10 Ji ber germayiya xelê ya ku
dişewitîne, çermê me mîna firnê
reş bû.
11 Li Siyonê pîrekan, li bajarên
Cihûda, jinên ku neçûne mêr
nizm kirin.
12 Serok ji destên xwe ve hatin
daliqandin; kalepîran nehesiban-
din.
13 Xortan kevirên aşê kişandin û
di bin êzing de zarok çerixîn.
14 Kalepîr ji ber deriyê bajêr
rûniştinê ve, xort jî ji sazên xwe
qut bûn.
15 Şabûna dilê me hate birrîn;
reqsa me zivirî şînê.
16 Ji serê me tac ketin; wey li serê
me! Ji ber ku me sûc kirin.
17 Bona vê dilê me bîrçûyî ye; ji
ber vana çavên me reş bûne.
18 Ji ber Çiyayê Siyona ku bûye
wêran; li ser wê rovî digerin.
19 Tu, ya XUDAN, di texta xwe
de abadîn rûdinî; texta te ji nifşe
heta nifşeyan didome.
20 Ma çima tu abadîn me ji bîr
dike, di domahîka rojan de çima
tu me ber didî?
21 Me vegerîne xwe, ya XUDAN
û em ê bizivirin; mîna berê, rojên
me nû bike!
22 Lê belê te bi tûmî, bi tûmî me ji
xwe avêt; li dijî me zehf bi hêrsî.

# HÊZEKÎÊL

*Pêşgotin*

Peyxamber Hêzekîêl B.Z. di sala 586'an de berî û paşî ketina Orşelîmê li Babîlê ve jiya. Hêzekîêl bangî yên li sirgûnê ne jî, yên li Orşelîmê ne jî kir. Şeş taybetiyên bingeh yên vê pirtûkê hene:

1.Xwedê Hêzekîêl bi peyxamberî wezîfedar dike.
2.Daraziya Xwedê bêtariya ku dê were û îkazên di derbarê ketina Orşelîmê de.
3.Di derbarê neteweyên ku tahde li gelê Îsraêlê dikin û rêya wan şaş dikin de belavokên Xwedê.
4.Paşî ketina Orşelîmê, wada Xwedê ya bona li gelê Îsraêlê xemrevîniyê bike û hatinek rewnaqdar bêje.
5.Gotinên peyxamberî yên li dijî Gogê hatine gotin.
6.Xewn û xeyala di derbarê perestgeha nû de û ji gelê Îsraêl re gîhaştina xweşiya xwe yî berê.

Hêzekîêl xwedî baweriyek ji dil bû. Gellek peyxamên bi navdîtiya xewn û xeyalan ji Xwedê sitendiye gîhand gel. Dema vêya dikir serî li gellek tevgerên zindî û nîşankî da. Hêzekîêlê ku girîngiya guhertina dil da pêşiyê, tîne zimên ku her kes ji gunehê ku bi xwe kiriye pirsiyar e. Lê li ber vana dîsa jî bawer dike ku dê gelê Îsraêlê bigihêje xweşiya xwe yî kevin.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-3:27 | Banga Hêzekîêl |
| 4:1-24:27 | Belavokên di derbarê têkçûna Orşelîmê de |
| 25:1-32:32 | Li dijî neteweyan daraziya Xwedê |
| 33:1-37:28 | Ji gelê xwe re wada Xwedê |
| 38:1-39:29 | Gotinên peyxamberî yên li dijî Gogê hatine gotin |
| 40:1-48:35 | Xewn û xeyala di derbarê perestgeha di hatinê de û welat de |

*Rewnaqiya Xwedê ji Hêzekîêl re tête daxuyanî kirin*

1 Û di sih salî de, di meha çaran
de, di roja pêncemîn ya mehê
de, dema ez li cem çemê Kebarê
di nav sirgûnan de bûm, wusa bû
ku, ezman vebû û xewn û xeyalên
Xwedê dîtim. 2 Di roja pêncemîn
ya mehê de, di sala pêncemîn ya
sirgûntiya qiral Yehoyakîm de
bû; 3 li welatê Kildaniyan, li cem
çemê Kebarê ji kahîn Hêzekîêlê
lawê Bûzîn re gotina XUDAN
eşkere hat û li wir destê XUDAN
li ser wî bû.
4 Û nihêrtim û a vay, ji bakur ve
bayê ku duguvêje, ewrek bêsekin
agir diweşîne tê, li dora wê qerpîn
û di nava wê de, lajwerda ku wekî
di nav agir de dibiriqe. 5 Û ji nav
wê ve mînakiyê çar aferîdeyên
zindî derketin. Û xuyabûna wan
wusa bû: Di wan de mînakiya
mirov hebû 6 û çar heb wecê her
yekê hebû û ji wan çar baskên her
yekî hebû. 7 Û lingên wan lingên
rast bûn û bin pêyên wan mîna
binpêyên golikan bû û mîna tûncê
bi sîqal dibiriqîn. 8 Û li çar aliyên
wan di bin baskên wan de destê
mirovan hebû; wec û bazikên her
çarî jî wusa bû: 9 Bazikên wan
bi hev re hevbend bûbû; dema
di rê de dimeşiyan nedizivirîn;
her yek raste rast berbi pêşiyê ve
dimeşiyan. 10 Mînakiya wecên
wan jî di wan de wecê mirov, li
aliyê rastê yê çar hebî wecê şêr
û li aliyê çepê yê çar hebî wecê
ganêr, yê çar hebî jî wecê qertel
hebû. 11 Û wecê wan û bazikên
wan ji jor ve hatibûn cuda kirin;
du bazikê her yekê bi pev re hev-
bend bûbû; du bazik jî bedena wan
dinuxumandin. 12 Û her yek wekî
raste rast bi pêşiyê ve dimeşiyan;
ruh xwest ku bi ku derê ve here
ew bi wê derê ve çûn; ew bê ver-
gerîn dimeşiyan. 13 Dema em
werin mînakiya aferîdeyên bi
canî, xuyabûna wan mîna pêtên
agir yên dişewitin, mîna xuyabû-
na pêtalê bû; di nav aferîdeyên bi
canî de ew agir dadiket û radibû û
agir rewnaq bû û ji agir ve birûsk
vedijand[1]. 14 Û aferîdeyên bi canî
mîna xuyabûna avêtina birûsk di-
reviyan û şunda vedigeriyan.
15 Dema min li aferîdeyên bi canî
dinihêrt, a vay, li cem aferîdeyên
bi canî, bona her çar wecên wan,
li erdê tekerek hebû. 16 Xuyabûna
teker û avahiya wan mîna zimrûdê
ezmanî bû û wekheviya her çarî
jî yek bû û xuyabûn û avahiyên
wan, wekî teker di hundirê teker
de be. 17 Dema dimeşiyan bi çar
aliyên xwe ve jî diçûn; bêyî zivirê
dimeşiyan. 18 Toqên tekeran jî bi-
lind bû û tirsehêz bû û toqên her
çaran bi dor û ber, bi çavan ve tijî
bû. 19 Û her ku aferîdeyên bi canî

1 Lêdixist.

dimeşiyan, teker jî li cem wan
dimeşiyan û her ku aferîdeyên bi
canî ji erdê ve bilind dibûn, teker
jî ji erdê ve bilind dibûn. 20 Ruh
xwest ku biçe ku derê diçûn wir,
cîhê ku ruh dixwest biçê û teker
ji kêlekên wan ve bilind dibûn;
ji ber ku ruhê aferîdeyê bi can
di tekeran de bû. 21 Her ku ew
dimeşiyan, vana jî dimeşiyan û
her ku ew disekinîn, vana jî dise-
kinîn û her ku ew bilind dibûn, li
kêlekên wan teker jî bilind dibûn;
ji ber ku ruhê aferîdeyê bi canî di
tekeran de bû.
22 Û li ser aferîdeyên bi can wekî
quba ezmanê, mîna belûra tir-
sehêz, ji jor ve li ser serên wan be-
lavbûyî[1] bû. 23 Û di bin qubê de
bazikên wan berbi hev raste rast
bûn û du bazikê ji vî alî duxumîne
û du bazikê ji aliyê din ve duxumî-
ne ên her yekî hebû. 24 Û dema
dimeşiyan hengameya bazikên
wan bihîstim, wekî dengê gellekî
avan, wekî dengê Şiyandar, dengê
tevliheviyek, wekî welweleya
artêşekî; dema disekinîn bazikên
xwe dadixistin. 25 Û li ser qubeya
ku li ser serê wan e dengek hebû;
dema disekinîn bazikên xwe da-
dixistin.
26 Û li ser qubeya ku li ser serê
wan e wekî xuyabûna yaqûda
ezmanî, mînakiya textê hebû û li
ser mînakiya textê, ji jor ve mîna-
kiya xuyabûna mirov hebû. 27 Û
ji pişta wî jorîn ve xuyabûna wî,
mîna lajwerdekî dibiriqe dîtim,
wekî ku hundirê wê bi dor û ber
xuyabûna agir û ji pişta wê jêr ve
xuyabûna wê dîtim wekî xuyabû-
na agir û li dora wê rewnaqî hebû.
28 Roja baranê xuyabûna kevana
di ewra de ye çawa be, xuyabûna
şewlê jî wusa bû. Vêya xuyabûna
mînakiya bilindahiya XUDAN
bû. Û dema dîtim bi ser rû ve ke-
tim û dengê yekî ku gotinê dibêje
bihîstim.

*XUDAN bangî Hêzekîêl dike*

2 Û ji min re got: Lawê mirov,
rabe ser pêlan ku ez bi te re
biaxifim! 2 Û dema ji min re got,
Ruh ket hundirê min û min li ser
pêlan ve rakir û yê ku gotinê ji
min re dibêje bihîstim. 3 Û ji min
re got: Lawê mirov, ez te dişînim
ji lawên Îsraêl re, ji neteweyên ku
li dijî min asê ne re, ew û bapîrên
wan, heta îroj li dijî min guneh
kirin. 4 Û ev zarokana rû zexm û
dil hişk in; ez te ji wan re dişînim
û tuyê ji wan re bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje! 5 Û ew, di-
xwaze bila guhdarî bikin, dixwa-
ze bila birevin – ji ber ku ew ma-
lekî asê ne – ! dîsa dê bizanibin ku
di nav wan de peyxamberek heye.
6 Û tu, ya lawê mirov, li cem te
qirş û qal û kelemî hebin jî û tu

[1] Vegirtî.

di nav dûpişkan de rûnê jî ji wan
zilaman ve metirse û ji gotinên
wan ve metirse; ew wekî malekî
asê bin jî, tu dîsa ji wan metirse û
ji wecên wan jî bêzar nebe! 7 Di-
xwaze bila guhdarî bikin, dixwa-
ze jî bila birevin, tuyê gotina min
ji wan re bibêje; ji ber ku asê ne!
8 Û tu, ya lawê mirov, ya ku ez ê
ji te re bibêjim guhdarî bike; mîna
wê mala asê tu asê nebe; devê
xwe veke û ya ku ez didim te bi-
xwe! 9 Û nihêrtim û a vay, destekî
direjî min bû û a vay, di wî destî
de balora pirtûkekê hebû 10 û wê
li ber min vekir û rûyê wê û paşê
wê nivîsandî bû û di wê de lawij,
nalîn û fîxan hebûn.

*Îkaza ji gelê Îsraêl re*

3 Û ji min re got: Ya lawê mirov,
tiştê ku te dît bixwe, vê balorê
bixwe û here û ji mala Îsraêlê re
bibêje! 2 Û devê xwe vekirim û
wê balorê bi min ve da xwarin.
3 Û ji min re got: Ya lawê mirov,
vêya bi zikê xwe ve bide xwarin
û bi vê balora ku dame te rêviyên
xwe dagire. Û xwarim û di devê
min de mîna hungiv şêrîn bû.
4 Û ji min re got: Ya lawê mirov!
De, here mala Îsraêlê û gotinên
min ji wan re bibêje! 5 Ji ber
ku tu ne ji neteweyek gotina wê
xerîb û zimanê wê dijwar e re,
lê ji mala Îsraêlê re tête şandin;
6 tu ji gellek neteweyên ku tu zi-
manên wan fêhm nake, gotinên
wan biyan û zimanên wan dijwar
in re nayê şandin. Rastî, ger te
ji wan re bişandima, dê te guh-
darî bikirana. 7 Lê belê dê mala
Îsraêlê nexwaze ku te guhdarî
bike; ji ber naxwazin ku min
guhdarî bikin; ji ber ku eniya
hemûya mala Îsraêlê hişk û dilê
wê zexm e. 8 A vay, li dijî wecê
wan, wecê te hişk kirim û li dijî
eniyên wan eniya te hişk kirim.
9 Eniya te mîna almastê[1] ji ba-
rastê tundtir kirim; wekî ku ew
malekî asê ne, ji wan metirse û ji
wecê wan ve bêzar nebe! 10 Û ji
min re got: Ya lawê mirov, hemû
gotinên min ên ku ez ê ji te re bi-
bêjim bigire û bixe dilê xwe û bi
guhên xwe ve bibihîze. 11 Û de,
here sirgûnan, lawên neteweya
min û ji wan re bibêje û dixwaze
bila guhdarî bikin, dixwaze bila
birevin, ji wan re bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje!
12 Û Ruh min rakir jorê û ji pêy
min, bi gotina: Bila bilindahiya
XUDAN ji cîhê xwe ve pîroz be!
gurmîniyek mezin bihîstim. 13 Û
her ku bazikên aferîdeyên bican
li hev diketin, dengê wan û li cem
wan şemateya tekeran, dengê gur-
mîniya mezin bihîstim. 14 Û Ruh
min rakir jorê û min rahişt û bir
û ez bi tahliyê, bi hêrsa ruhê xwe

---

1 Elmas.

ve çûm û destê XUDAN li ser
min ve xwurt bû[1]. 15 Û ez hatim
cem sirgûnên ku li Tel-Abîbê ne,
hatim cem yên ku li kêleka çemê
Kebarê rûdinin û li cîhê ku ew lê
rûdinin rûniştim û di nav yên ku
li wir rûdinin de heft rojî bi şaş û
metalî rûniştim.
16 Û paşî heft rojî wusa bû ku,
vê gotina XUDAN ji min re hat:
17 Lawê mirov, min te ji mala
Îsraêlê re notirvan danî; gotinê
ji devê min ve bibihîze û ji aliyê
min ve wan îkaz bike! 18 Dema
ez ji mirovê xerab re: Tuyê mu-
heqeq bimire bibêjim, ger tu wî
îkaz nekî û bona ku zilamê xerab
xwe ji rêya xwe yî xerab biparê-
ze û bona ku bijî tu jê re nebêje,
dê ew zilam di fesadiya xwe de
bimire, lê belê ez ê ji destê te ve
li xwîna wî bigerim! 19 Lê belê
ger tu yê xerab îkaz bikî û ew ji
xerabiya xwe û ji rêya xwe yî xe-
rab venegere, dê ew ê di xerabiya
xwe de bimire; lê belê tuyê xela-
siya canê xwe bike! 20 Û ger zi-
lamê salih ji rastiya xwe vegere û
xerabiyê bike û ez tilpekiyê dey-
nim pêşiya wî, dê ew ê bimire; ji
ber ku te wî zilamî îkaz nekir, dê
ew zilam di sûcê xwe de bimire û
karên wî yên rast ên ku kirine, dê
di bîr de neyê, lê belê ez ê ji destê
te ve li xwîna wî bigerim! 21 Lê
belê ger tu bona zilamê salih sûcê
neke, zilamê salih îkaz bike û ew
sûcê neke, helbet dê bijî, ji ber ku
wî guh daye îkazkirinê tuyê jî bi
vî awayî canê xwe xelas bike!
22 Û li wir, destê XUDAN li ser
min bû û ji min re got: Rabe, der-
keve deştê û ez ê li wir bi te re
biaxifim. 23 Û rabûm û derketim
deştê û a vay, li wir mezintiya
XUDAN, mîna mezintiya ku li
cem çemê Kebarê dîtibûm se-
kinîbû û bi ser dev û rû ve ketim.
24 Û Ruh kete hundirê min û min
rakir ser pêlan û bi min re axifî û
ji min re got: Here xwe di mala
xwe de bigire[2]! 25 Lê belê tu, ya
lawê mirov, a vay, dê qeydan li te
bixin û te bi wan ve girê bidin û
tuyê dernekeve nav wan 26 û ez
ê zimanê te bi polkeya te ve bi-
zeliqînim û tuyê bêziman bibe û
tuyê nebe yê ku bi wan ve dipeke;
ji ber ku ew malekî asê ne! 27 Lê
belê dema ez bi te re biaxifim, ez
ê zimanê te vekim û tuyê ji wan
re bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Yê ku dibihîze bila bibihî-
ze û yê ku jê direve bila bireve; ji
ber ku ew malekî asê ne!

*Dorlêgirtina Orşelîmê ji berê ve tête*
*gîhandin*

4 Tu jî, ya lawê mirov, ji xwe re
tûleyekê rahêje û wê deyne ber

[1] Bihêz, hêzdar, an jî. Biquwet bû.

[2] Bikeve mala xwe, derî bigir û dernekeve!

xwe û bajarekî li ser wê binexşîne, Orşelîmê binexşîne 2 û dora wê bipêçe û li hemberî wê bircan çêbike û li dijî wê meterîsan kom bike û li dijî wê artêşgehan deyne û li dijî wê li hemberdoran gîskên har deyne! 3 Û ji xwe re sacên hesin rahêle û bona ku bibe dîwarê hesin, wê deyne navbera xwe û bajêr û wecê xwe berbi wê bizivirîne û dê dora wê bête girtin û tuyê li hember dora wê bigire. Dê ev ji mala Îsraêlê re bibe nîşanek.

4 Lê tu li aliyê xwe yî çepê rakeve û fesadiya mala Îsraêlê deyne ser wê; li gor hejmara rojên ku tuyê li ser wê rakeve, tuyê fesadiya wan bikişîne. 5 Û min fesadiya wan, li gor ku hejmara salan wekî hejmara rojan danîm ser te, sê sed û nod roj; tuyê bi vî awayî fesadiya mala Îsraêlê bikişîne. 6 Û dema tu vana biqedîne, dîsa tuyê li ser aliyê xwe yî rastê rakeve û tuyê fesadiya mala Cihûdayê bikişîne; çel roj, her roj li dêvila salekê, vêya danîm ser te. 7 Û tuyê mîna kinc li bazûyê wî hildayî, berê xwe bizivirîne Orşelîma ku hember dor lê hatine girtinê û tuyê li dijî wê peyxambertiyê bike. 8 Û a vay, ez ê bendan li te bixim û heta ku tu rojên dorgirtina xwe biqedînî tuyê ji aliyekî xwe nezivire aliyê xwe yî din.

9 Û tu ji xwe re genim û ceh û paqle û nîsk û garis û çewder rahêle û wan bixe feraxekî û ji wan ji xwe re nan çêbike û li gor rojên ku tuyê li ser aliyê[1] xwe rûnê, sê sed û nod roj tuyê ji wê bixwe. 10 Û xwarina ku tuyê bixwe, dê bi pîvanê be; di rojê de bîst şekel[2]; tuyê dem bi demî bixwe. 11 Û tuyê bi pîvanê avê vexwe, ji şeş parî hînekê[3] pariyekî, tuyê dem bi demî vexwe. 12 Û tuyê mîna pîdeyên ceh çêbike û bixwe û tuyê bi pîsitiya ku ji mirova derdikeve li ber çavên wan wê bikelîne. 13 Û XUDAN got: Di nav neteweyên ku ez ê wan bajomê de, dê lawên Îsraêl nanên xwe bi vî awayî, bi mindarî bixwin. 14 Û min got: Ax, ya Xudan, XUDAN! A vay, canê min nebûye mindar; ji ber ku ji ciwantiya xwe heta niha laş û ya ku heywan perçe kiriye nexwarime û goştê mekrûh neketiye devê min. 15 Û ji min re got: Binêre, li dêvila pîsitiya mirov, sergînê dewara dam te û tuyê nanê xwe li ser wê çêbike! 16 Û ji min re got: Lawê mirov, a vay, ez ê li Orşelîmê alîkariya nan bişkînim û dê di nav tirsê de, bi pîvanê ve nan bixwin û di nav şaşitiyê de dê bi pîvanê ve avê vexwin; 17 ji ber ku dê bibin motajê nan û avê û dê gişt pev re

1 An jî: Li ser hêlekî.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Li rasteka menan binêrin.

şaş bimînin û dê di fesadiya xwe
de buhulin.

5 Û tu, ya lawê mirov, ji xwe re
şûrekî tûj rahêle û tuyê wê ji
xwe re wekî guzana berber rahêle
û tuyê wê ji serê xwe û rîha xwe
ve derbas bike û bona weznê ji
xwe re tereziyekê rahêle û mûyan
liq bi liqî cuda bike. 2 Dema rojên
dorlêgirtina bajêr tijî bûn, tuyê ji
sisiyê yekî di nava bajêr de bi agir
ve bişewitîne û tuyê ji sisiyê yekî
rahêle û bi şûr li dora wê bixe û
tuyê ji sisiyê yekî berbi bayê ve
berde; ez ê jî li pêy wan ve şûr
bikişînim. 3 Û tuyê ji wan çen-
dekî rahêle û tuyê bi dawa xwe ve
wan bipêçe. 4 Û tuyê dîsa ji wan
rahêle û wan bavêje nav agir û
tuyê wan di agir de bişewitîne; di
hemûya mala Îsraêlê de, dê ji wê
agir derkeve.
5 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ev Orşelîm e! Wê danîm nav
neteweyan û welatên ku li dora
wê ne. 6 Û bi xerabî kirinê ji ne-
teweyan zêdetir li dijî daraziyên
min û ji welatên ku li dora wê
ne, zêdetir li dijî zagonên min
bû asê; ji ber ku daraziyên min ji
xwe avêtin û dema em werin za-
gonên min, di wan de nemeşiyan.
7 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Madem ku hûn ji ne-
teweyên ku li dora we ne zêdetir
şematekar in û hûn di zagonên
min de nemeşiyan û we li gor
daraziyên min nekirin, we li gor
daraziyên neteweyên ku li dora
we ne jî nekirin; 8 ji ber vê yekê
Xudan, XUDAN wusa dibêje: A
vay, ez, ez jî li dijî te me û ez ê li
ber çavên neteweyan di nav te de
bona te daraziyan bidim. 9 Û tiştê
ku nekirime û tiştekî wekî wê ca-
rekî din ez ê nekim, ji ber hemû
karên te yî mekrûh, ez ê di te de
bikim. 10 Ji ber vê yekê dê di te
de bav lawên xwe bixwin û dê law
bavên xwe bixwin û ez ê di ser te
de daraziyan bidim û hemûya ji
ber te mayî ye ez ê bidim ber her
bayî. 11 Xudan, XUDAN dibêje:
Ji ber vê yekê, bona mafê hebû-
na min, ji ber ku te bi hemû tiştên
xwe yî sik û bi hemû tiştên xwe yî
mekrûh, meqdîsa min mirdar kiri-
ye, bi rastî, ez ê jî te nehêvişînim;
dê çavê min te neparêze û dê hey-
fa min li te neyê. 12 Dê ji te, ji
sisê yek bi webayê bimirin û dê
di hundirê te de bi xelayê heleq
bibin û ji sisê yek, dê li dora te bi
şûr bikevin û ez ê ji sisê yek bi her
bayî ve berdim û ez ê li pêy wan
ve şûr bikişînim.
13 Bi vî awayî dê dawiya hêrsa min
were û ez ê li dijî wan xeyda xwe
bisekinînim û bi vî awayî ez ê xem-
revîniyê bibînim û dema ez xeyda
xwe yî li dijî wan bighînim dawiyê,
dê bizanibin ku, ez, XUDAN, di
xîreta xwe de, min got. 14 Û di nav

neteweyên ku li dora te ne de, li ber
çavên her zilamê ku di rê de der-
bas dibe, ez ê te bikim wêraneyek
û tiştekî ku şermezar dike. 15 Tuyê
di nav neteweyên ku li dora te ne de
bibe tiştekî ku şermezar dike, qer-
fên xwe pê dikin, jê fêr bête stendin
û tiştekî ku şaş dike, wê çaxê ez ê
bi hêrsê û bi xeydê û bi pekandinên
bi xeyd li ser te daraziyan bidim.
Ez, XUDAN, min got. 16 Wê çaxa
ku, tîrên helaq kir yê xelaya ku ez ê
ji wan re bişînim, bona ku we helaq
bikin ez ê bişînim ser we. Û ez ê li
ser we xelayê zêde bikim û ez ê alî-
kariya we yî nan bişkînim 17 û ez
ê xelayê û heywanên xerab bişînim
ser we û dê te ji zarokên te ve bikin
û dê ji nava te weba û xwîn derbas
bibin û ez ê şûr bînim ser te; ez,
XUDAN, min got.

*Pûtperestiya li çiyayên Îsraêlê tête şermezar kirin*

6 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 2 Ya lawê mirov, berê xwe
bizivirîne çiyayên Îsraêlê û ji wan
re peyxambertiyê bike 3 û bibêje:
Çiyayên Îsraêlê, gotina Xudan,
XUDAN guhdarî bikin! Xudan,
XUDAN ji çiyayan û ji giran û ji
newalan û ji çeman re wusa dibêje:
A vay, ez ê şûr bi ser we ve bînim
û cîhên we yî bilind tune bikim.
4 Û dê pêşkêşîgehên we wêran
bibin û dê pûtên we yî rojê bişkên
û ez ê ji we yên ku hatine lêxistin
li ber pûtên we bixînim. 5 Û ez
ê laşên lawên Îsraêl deynim ber
pûtên wan û ez ê hestiyên we li
dora pêşkêşîgehên we bireşînim.
6 Ji bo pêşkêşîgehên we xerab û
wêrane bibin û pûtên we bişkên
û ji navendê rabin û pûtên we yî
rojê bên jêkirin û buqulipin û bona
ku karên we bên paqij kirin, dê li
hemû cîhên ku hûn lê rûdinin bajar
xera bibin û dê cîhên bilind wêrane
bibin. 7 Û yên ku hatine lêxistin,
dê di nav we de bikevin û hûn ê
bizanibin ku, ez XUDAN im.
8 Û dema hûn di nav neteweyan
de bên belav kirin, bona ku ji
nav neteweyan, ji we ên ku ji şûr
reviyane û xelas bûne hebin ez ê
maweyekê bihêlim. 9 Û ji we yên
ku reviyane û xelas bûyîne, di nav
neteweyên ku hatine sirgûn kirinî
de dê min di bîra xwe de bînin, ji
ber ku ez, ji dilê wanî zinê dike
ê ku ji min cuda bûye û ji çavên
wanî zinê dikin ên ku li pêy pûtan
diçin ve şikestim[1] û ji ber hemû
xerabiya ku di hemû karên xwe yî
mekrûh de kirine, dê di çavên xwe
de xwe bi xwe bikerihin. 10 Û dê
bizanibin ku, ez XUDAN im; vê
xerabiya ku ez ê li wan bikim bê
sedem negotim.
11 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Bi destê xwe ve biperpite û bi
lingên xwe ve hilkutîne û bi-

*1* An jî: Dilê wan.... çavên wanî şikandim.

bêje: Ji ber hemû tiştên mekrûh
ên mala Îsraêlê heyf e! Ji ber ku
dê bi şûr û bi xelayê û bi webayê
ve bikevin. 12 Yê ku li dûra ye,
dê bi webayê ve bimire û yê ku
li nêzîkê ye, dê bi şûr ve bikeve
û maweya ku hawirdor lê hatiye
girtin, bi xelayê ve bimire û ez ê
xeyda xwe li ser wan biqedînim.
13 Û dema li nav pûtên wan, li
dora pêşkêşîgehên wan, li ser her
girê bilind, li ser hemû girên çiya-
yan û di bin her darê hêşîn de û di
bin her darçiloyên pel himbiz de,
li wî cîhê ku ji hemû pûtên xwe
re bêhnên xweş pêşkêş dikirin re
ji wan yên ku hatine kuştin bên
raxistin, hûn ê bizanibin ku, ez
XUDAN im. 14 Û ez ê destê xwe
bi ser wan ve dirêj bikim û ji çolê,
berbi Dîblayê, li hemû cîhên ku lê
rûdinin, ez ê welat bikim wêrane
û tenha û dê bizanibin ku, ez XU-
DAN im.

*Dawî nêzîk bû*

7 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 2 Û tu, ya lawê mirov,
Xudan, XUDAN ji warê Îsraêlê
re wusa dibêje: Dawî! Dawiya çar
aliyê welêt hat! 3 Niha ew dawî li
ser te ye û ez ê hêrsa xwe bi ser te
ve bişînim û li gor rêyên te ez ê
daraziyê li te bikim û ez ê hemû
karên te yî mekrûh bînim ser te.
4 Û dê çavê min te neparêze û dê
heyfa min li te neyê, lê belê rêyên
te bînim ser te û dê tiştên te yî
mekrûh di hundirê te de bin û hûn
ê bizanibin ku ez XUDAN im!
5 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Xerabî, xerabiyek; a vay, tê! 6 Da-
wiyek hat, ew dawî hat; li dijî te
hişyar dibe; a vay, tê! 7 Dor hate
te, yê ku li welêt rûdine; wext hat,
roj nêzîk e; ne roja ku li ser çiyan
qêrînên kêfxweşiyê ye, roja wel-
welê ye! 8 Ez ê niha, di nêzîk de
hêrsa xwe bi ser te ve birijînim û
ez ê dawiya hêrsa xwe yî sor ya
li dijî te ye bînim û li gor rêyên
te, ez ê daraziyê li te bikim û ez
ê hemû karên te yî mekrûh bînim
ser te. 9 Û dê çavê min te neparê-
ze û dê heyfa min li te neyê, ez ê
li gor rêyên te bînim ser te û dê
tiştên te yî mekrûh di hundirê te
de bin û hûn ê bizanibin ku, ez
XUDAN, ez lêdixim.
10 A vay, ew roj! A vay, tê! Dora
te hat; ço kulîlk vekir, bitirî zîl
da. 11 Zordestî rabû ser pêlan û
bû şiva xerabiyê; dê ji wan û ji
ajaweyên wan tu kes û ji malên
wan ve tu tişt nemîne û dê di wan
de bilindahî nemîne. 12 Wext
hat, roj nêzîk dibe! Yê ku distîne
bila kêfxweş nebe û yê ku difroşe
bila şînê nekişîne; ji ber ku li ser
hemûya civaka wê xezeb heye.
13 Ji ber ku ger di jiyanê de
bimînin jî, dê yê firotiye nikaribe
vegere tiştê ku firotiye, ji ber ku
xewn û xeyal bona hemûya civa-

ka wê ye, dê tu kes venegere û dê
tu kes bi fesadiya jiyana xwe ve
xwurt nebe.
14 Li boriyê xistin û her tiştî ama-
de kirin; lê belê tu kes naçe cengê;
ji ber ku xezeba min li ser hemûya
civaka wê ye. 15 Li derve şûr û li
hundir weba û xela; yê ku li beyarê
ye dê bi şûr ve bikeve û dê yê ku
li bajêr ve dimîne ji aliyê weba û
xelayê ve bête daqurtandin. 16 Lê
belê ji wan yên ku birevin û xelas
bibin, dê xelas bibin û mîna ke-
vokên çem dê li ser çiyayan bin,
her yek ji ber fesadiya xwe, gişt
di nalînê de ne. 17 Dê hemû dest
sist bibin û hemû çong mîna avê
dê lawaz bibin. 18 Û dê cilikan[1] li
xwe bikin û dê bêzarî bi wan bi-
gire û dê di hemû wecan de şerm
û di hemû seriyan de por lîçikan-
dî be. 19 Û dê zîvên xwe bavêjin
kuçan û dê zêrên wan mindar bên
hesibandin, dê di roja XUDAN ya
xezebê de zîv û zêrên wan, wan
xelas nekin; dê canên wan têr
neke û zikên wan tijî neke; ji ber
ku ji wan re bû tilpekiya fesadiyê.
20 Xweşikiya xemla wê jî, wê xist
bitiriyê û pûtên xwe yî mekrûh û
sik ji wê çêkirin; ji ber vê yekê, wê
ji wan re kirim mîna tiştekî mindar.
21 Û ji bo ku wê talan bikin, ez ê
bidim destê biyanan û ji bo ku talan
bikin, ez ê wê bidim destê xerabên
dinê û dê wê xera bikin. 22 Û ez ê
wecê xwe ji wan bizivirînim û dê
miqamê minî veşartî xera bikin û
dê diz bikevinê û wê xera bikin.
23 Zincîrê çêbike! Ji ber ku welat
bi sûcên xwîndar ve tijî û bajar
bi zordestiyê ve tijî ye! 24 Û ez
ê herî xerabên neteweyan bînim û
dê malên wan ji xwe re bikin milk
û ez ê quretiya xwurtan biqedînim
û dê cîhên wanî pîroz xera bibin.
25 Bêzarî tê û dê ew li xweşiyê[2]
bigerin û dê neyê dîtin. 26 Dê
asîw bi ser asîwê ve bê û agahi-
ya xerab bi ser agahiya xerab ve
derkeve û dê ji peyxamber ve bi
xewn û xeyalê bigerin; lê belê dê
di kahîn de zagon û di kalepîran
de şîret nemîne. 27 Dê qiral şînê
bigire û beg bi şaşitiyê xwe bu-
xumîne û dê destên netewa welêt
sist bibin; ez ê li gor rêyên wan li
wan bikim û li gor heqê wan ez ê
serweriyê li wan bikim û dê biza-
nibin ku, ez XUDAN im!

*Di Perestgeha Xwedê de Pûtperestî*

8 Û di sala şeşemîn de, di meha
şeşan de, di roja pêncemîn ya
mehê de, dema ez di mala xwe de
rûniştîbûm û kalepîrên Cihûdayê
jî li hemberî min rûniştibûn wusa
bû ku, li wir destê Xudan, XU-
DAN ket ser min. 2 Û nihêrtim û a
vay, mînakiyek wekî xuyanîbûna

*1* Yanê çûl.

*2* Aştiyê.

agir; ji xuyabûna pişta wî berjêr-
tir agir û ji pişta wî jortir mîna
xuyabûna rewnaqê, wekî lajwer-
da ku dibiriqe. 3 Û wî, şiklê des-
tekî dirêj kir û ji cênîgekî serê min
girt û Ruh di nav erd û ezmanan
de min bilind kir û min di xewn û
xeyalên Xwedê de anî Orşelîmê,
cîhê ketina deriyê hewşa hundirê
ku li bakur dinêre; cîhê pûtê çav-
nebariyê ê ku hesûdiyê dike, li wir
bû. 4 Û a vay, mezintiya Xwedayê
Îsraêlê, li gor xuyanîbûna[1] ku li
deştê dîtibûm li wir bû.
5 Û ji min re got: Ya lawê mirov,
niha çavê xwe berbi rêya bakur
ve rake! Û çavên xwe berbi rêya
bakur ve bilind kirim û a vay, ew
pûtê hesûdiyê, li bakurê deriyê
pêşkêşîgehê, di cîhê ketinê de bû.
6 Û ji min re got: Lawê mirov, ma
çi dikin, tu dibînî? Bona ku ez ji
Perestgeha xwe ve dûr bikevim,
mala Îsraêl li vir tiştên mekrûh ên
mezin çêdikin. Û dîsa tuyê tiştên
mezin ên mekrûh bibînî!
7 Û min anî deriyê hewşê û nihêr-
tim û a vay, di dîwêr de qulek. 8 Û
ji min re got: Lawê mirov, haydê
dîwêr qul bike! û dîwêr qul kirim
û a vay, deriyek. 9 Û ji min re got:
Bikeve hundir û tiştên xerab ên
mekrûh yên ku li vir çêdikin bibî-
ne! 10 Û ketim hundir û dîtim û a
vay, sûretên her tewrê heywanên
xişok û yên sik û hemû pûtên
mala Îsraêlê li hember dorên
dîwêr ve hatibûn rêz kirin. 11 Û
ji kalepîrên mala Îsraêlê heftê kes
li ber wan sekinîbûn û Yaazan-
yayê lawê Şafan di nav wan de
sekinîbû; buxurdana her yekî di
destê wî de bû û bêhna ewra bu-
xurê derdiket. 12 Û ji min re got:
Lawê mirov, ma te dît kalepîrên
mala Îsraêlê, her yek di odeyên
xwe yî bi pêşdarî de, di tariyê de
çi dikin? Ji ber ku ew: XUDAN
me nabîne, XUDAN dev ji welêt
berda! dibêjin. 13 Û ji min re got:
Dîsa tuyê hîn tiştên dinên mekrûh
ên mezin ku dikin, bibîne!
14 Û min anî cîhê ketina deriyê
mala XUDANê ku berbi rojhilatê
ye û a vay, pîrekên ku bona Tam-
mûz digiriyan li wir rûniştîbûn.
15 Û ji min re got: Ma te dît, lawê
mirov? Dîsa tuyê tiştên dinên hîn jî
ji vana mezintir, ên mekrûh bibîne!
16 Û min anî hewşa hundir ya
mala XUDAN û a vay, di deriyê
Perestgeha XUDAN de, di navbe-
ra eywan û pêşkêşîgehê de, qasî
bîst û pênc kesên ku pişta wan li
Perestgeha XUDAN û wecên wan
berbi rojhilatê ve zivirandî hebûn
û wan berê xwe dabûn rojhilatê û
ji rojê re peristinê dikirin. 17 Û ji
min re got: Ma te dît, lawê mirov?
Ma qey kirina tiştên mekrûh ên ku
li vir dikin bona mala Cihûdayê
tiştekî biçûk e ku welat bi zordes-

[1] Xewn û xeyal.

tiyê ve tijî kirin û dîsa min hêrs dikin? Û a vay, guliyê dirêjî pozê xwe dikin! 18 Ji ber vê yekê ez ê jî bi xeydê bikim; dê çavê min neparêze û dê heyfa min lê neyê û bi dengê bilind ji min re bang bikin jî, ez ê wan guhdarî nekim!

*Orşelîm tête biceza kirin*

9 Û bi dengê bilind bangî guhê min kir û got: Yên ku li ser bajêr ve hatine dayîn, wekî di destê her yekî de çekê ku helaq dike hebe, nêzîktir bike! 2 Û a vay, ji rêya deriyê jorîn ya ku berbi bakur e ve şeş zilam hatin, di destê her yekî de çekekî kujende hebû û di nav wan de zilamekî ku kincên kitanê li xwe kirî û di pişta wî de taximên nivîsê girêdayî hebû. Û ketin hundir û li cem pêşkêşîgeha tûncî sekinîn.
3 Û mezintiya Xwedayê Îsraêlê, ji ser Kerûbiyê ku li ser wê bû derket şêmûga xanî û bangî zilamê ku kitanan li xwe kiriye û di pişta wî de hûringê wî heye kir. 4 Û XUDAN jê re got: Ji hundirê bajêr, ji hundirê Orşelîmê ve derbas bibe û nîşan li eniyên zilamên ku ji ber hemû karên mekrûhê ku di hundirê wê de çêdikin dinalin û fîxanê dikin, bixe! 5 Û dema min dibihîst ji yên din re got: Li pêy wî, ji hundirê bajêr ve derbas bibin û lê bixin; bila çavên we neparêzin û bila heyfa we lê neyên; 6 bona ku hûn helaq bikin, li kalepîr û ciwan û xort û qîza ku neçûye mêr û zarok û pîrekan bixin; lê belê nêzîkî tu kesê ku nîşan li ser wan e nebin û ji Perestgeha min ve dest pê bikin! Wan jî ji kalepîrên ku li ber derî ne ve dest pê kirin. 7 Û ji wan re got. Xanî mindar bikin û hewşan bi yên ku hatine kuştin ve dagirin; derkevin! Û derketin û li bajêr lê xistin. 8 Û wusa bû ku, dema wan lêdixist, ez tena serê xwe mabûm û bi ser wec ve ketim û qêriyam û gotim: Ax, ya Xudan, XUDAN! Ma dema tu hêrsa xwe li ser Orşelîmê birijîne, tuyê hemû maweya Îsraêlê helaq bikî?
9 Û ji min re got: Fesadiya Îsraêlê û ya mala Cihûdayê zehf, zehf mezin e û welat bi xwînê ve tijî û bajar bi rêşaşiyê ve tijî ye; ji ber ku ew; XUDAN welat berda û XUDAN me nabîne! dibêjin. 10 Ez jî, dê çavê min neparêze û dê heyfa min li wan neyê û ez ê rêyên wan binim serên wan! 11 Û a vay, zilamê ku kitanan li xwe kiriye û di pişta wî de hûringê[1] wî heye bi gotina: Mîna ku te emir dabû min, wusa kirim, agahiyê anî!

*Bilindahiya Xwedê dev ji Perestgehê berdide*

10 Û nihêrtim û a vay, li ser quba ezman ya li ser serê

1 Taxima nivîsê.

Kerûbiyan e mîna kevirê yaqûtê
ezmanî, tiştekî mîna xuyabû-
na mînakiya text li ser wan ve
xuyanî bû. 2 Û bi zilamê ku ki-
tanan li xwe kiriye re axifî û got:
Bikeve bin Kerûbî, nav tekerên
ku dizivirin û ji nav Kerûbiyan
her du lepên xwe bi pêtên agir ve
dagire û bi ser bajêr ve bireşîne.
Û li ber çavê min ketê. 3 Û dema
zilam ketê, Kerûbî li aliyê rastê
malê disekinîn û ewr hewşa na-
vîn dagirt. 4 Û mezintiya XU-
DAN ji ser Kerûbî ve bilind bû û
li ser şêmûga malê sekinî û xanî
bi ewrê ve tijî bû û hewş bi rew-
naqiya mezintiya XUDAN ve tijî
bû. 5 Û heta hewşa ku li derve ye
dengê bazikên Kerûbiyan, dema
Xwedayê Şiyandar gotinê dibêje
çawa be, bi wî awayî hate bihîs-
tin. 6 Û dema ji zilamê ku kitanan
li xwe kiriye re bi gotina: Ji nav
tekerên ku dizivirin, ji nav Kerû-
biyan agir rahêje, emir da, wusa
bû ku, çû û li cem tekerekê sekinî.
7 Û ew Kerûbî, destê xwe ji nav
Kerûbiyan direjî agirê ku di nav
Kerûbiyan de ye kir û ji wê rahişt
û wê xist nav lepê zilamê ku kitan
li xwe kiriye, zilam jî rahişt û der-
ket. 8 Û di Kerûbiyan de, di bin
bazikên wan de şiklê destê mirov
hate xuya kirin.
9 Û nihêrtim û a vay, li cem Kerû-
biyan çar teker hebûn, li cem her
Kerûbiyek tekerek û xuyanîbûna
tekeran mîna zimrûdê ezmanî bû.
10 Û dema em werin xuyabûna
wan, wekheviya her çarî jî yek
bûn, wekî ku di hundirê teker de
teker hebe. 11 Dema dimeşiyan
bi çar aliyê hev ve diçûn; dema
dimeşiyan nedizivirîn, tenê serî
berê xwe bidaya ku li pêy wî
diçûn; dema dimeşiyan nedizivi-
riyan. 12 Û hemû bedena wan û
piştên wan û destên wan û bazi-
kên wan û teker, tekerên her çarî
jî bi hember dorê bi çavan ve tijî
bûn. 13 Ji tekeran re, dema min di-
bihîst, bi gotina tekerên ku dizivi-
rin hate bang kirin. 14 Û çar wecê
her yekî hebû; wecê yekem wecê
Kerûbî bû, wecê duwem wecê mi-
rov bû û wecê sêwem wecê şêr û
wecê çaremîn wecê qertel bû.
15 Û Kerûbî bilind bûn; aferîdeyê
bi can yê ku li cem çemê Kebarê
dîtime ev e. 16 Û her ku Kerûbî
dimeşiyan, teker jî li cem wan
dimeşiyan û Kerûbiyan bona ku
ji erdê ve hilkişin her ku bazikên
xwe radikirin, teker jî ji cem wan
nediqetiyan. 17 Her ku ew dise-
kinîn, vana jî disekinîn û dema
bilind dibûn tevî wan vana jî bi
wan re bilind dibûn; ji ber ku ruhê
aferîdeyê bi can di wan de bû.
18 Û mezintiya XUDAN ji ser
şêmûga xanî ve derket û li ser
Kerûbiyan sekinî. 19 Û Kerûbi-
yan bazikên xwe rakirin û dema
li ber çavên min derketin derve

ji erdê ve bilind bûn, teker jî li
kêlekên wan bûn û di cîhê ketina
deriyê rojhilatê ya mala XUDAN
de sekinîn û ji jor ve mezintiya
Xwedayê Îsraêlê daket ser wan.
20 Aferîdeyê bi can yê ku li cem
çemê Kebarê di bin Xwedayê
Îsraêlê de dîtime ev e û pê hîn
bûm ku, vana Kerûbî bûn. 21 Çar
bazikên her yekî û çar wecê her
yekî hebûn û di bin bazikên wan
de mînakiya destê mirova hebû.
22 Wekheviya wecê wan jî,
xuyabûna wan û ew bi xwe,
wecên ku li cem çemê Kebarê
dîtibûm bûn! Her yek raste rast
berbi pêşiyê ve dimeşiyan.

*Ceza Orşelîmê*

**11** Û Ruh min rakir û min
anî deriyê rojhilatê ê mala
XUDAN yê ku li rojhilatê dinê-
re û a vay, di cîhê ketina derî de
bîst û pênc kes û serokên netewê
Yaazanyayê lawê Azzûr û Pelat-
yayê lawê Benaya di nav wan de
dîtim. 2 Û ji min re got: Lawê
mirov, yên ku xerabiyê difikirin û
li vî bajarî şîretên xerab didin van
zilaman e; 3 ew dibêjin: Dema
avakirina xaniyan, ne nêzîk e; ev
bajar qazan, em jî goşt in! 4 Ji ber
vê yekê li dijî wan peyxamberti-
yê bike, ya lawê mirov peyxam-
bertiyê bike!
5 Û Ruhê XUDAN bi ser min
ve ket û ji min re got: Bibêje,
XUDAN wusa dibêje: Ya mala
Îsraêlê, we wusa gotin; ji ber ku
ez bi tiştên ku tên aqilên we ve
dizanim! 6 We hejmara yên ku
we li vî bajarî kuştine zêde kirin
û we kuçeyên wê bi yên ku ha-
tine kuştin ve dagirtin. 7 Ji ber
vê yekê, Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Yên hatine kuştin ên ku
we xistine hundirê wê, goşt ew
in; qazan jî ev bajar e; lê hûn ê
ji hundirê wê ve bên derxistin!
8 Hûn ji şûr tirsiyan; ez ê jî şûr
bînim ser we, gotina Xudan, XU-
DAN. 9 Û ez ê we ji hundirê wê
(Orşelîmê) derxînim û we bidim
destê biyanan û ez ê di nav we de
daraziyan bikim. 10 Hûn ê bi şûr
ve bikevin, ez ê li sînorê Îsraêlê
daraziyê li we bikim û hûn ê biza-
nibin ku, ez XUDAN im! 11 Dê
ev bajar ji we re nebe qazan û hûn
ê di hundirê wê de nebin goşt; ez
ê li sînorê Îsraêlê serweriyê li we
bikim! 12 Û hûn ê bizanibin ku,
ez XUDAN im; ji ber ku hûn di
zagonên min de nemeşiyan û we
daraziyên min nekirin, lê belê we
li gor ûsila neteweyên ku li dora
we ne bikar anîn.
13 Û wusa bû ku, dema min pey-
xambertiyê kir, Pelatyayê lawê
Benaya mir. Û bi ser rû ve ketim
erdê û bi dengekî bilind qêriyam
û gotim: Ax, ya Xudan, XUDAN!
Ma tuyê bitûmî bitûmî dawiya
maweya Îsraêlê bîne?

*Yên li Sirgûnê ne dê vegerin Welatê Îsraêlê*

14 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 15 Ya lawê mirov, birayên
te, birayên te bi xwe, zilamên ku
ji merivên te ne û hemûya mala
Îsraêlê, vana gişt ew zilamana ne
ku, yên ku li Orşelîmê rûdinin ji
wan re: Ji XUDAN ve dûr bin; ev
welat bi milkî ji me re hate dayîn!
gotibûn. 16 Ji ber vê yekê bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Min wan ji nav neteweyan ve dûr
kiribin û wan di nav welatan de
belav kiribin jî, dîsa li welatê ku
dê bigihêjinê bona demekî kurt,
ez ê ji wan re bibim pîrozgeh.
17 Ji ber vê yekê bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Ez ê we ji
nav neteweyan ve bidim hev û ji
welatên ku hûn lê belav bûyîne,
ez ê we li cem hev bicivînim û ez
ê welatê Îsraêlê dîsa bidim we!
18 Û dê bikevin wir û dê hemû
tiştên wê yên sik û hemû tiştên
wê yî mekrûh ji holê ve rakin.
19 Û ez ê yek dilekî bidim wan û
ez ê ruhekî nû bixim hundirê we
û ji bedenên wan dilê kevir derxî-
nim û dilekî ji goşt bidim wan ku,
20 bila di zagonên min de bimeşin
û bila bi daraziyên min ve bigirin
û bila wan bikin û dê ew ê bibin
netewa min û ez ê bibim Xwe-
dayê wan. 21 Û dema em bên wan
zilaman, ewên ku, dilên wan li
pêy tiştên wanî sik û mekrûh ve
dimeşin, ez ê rêyên wan bînim serê
wan! Gotina Xudan, XUDAN.

*Rewnaqiya Xwedê ji Perestgehê vedikişe*

22 Û Kerûbî bazikên xwe rakirin
û teker li cem wan bûn û ji jor ve
mezintiya Xwedayê Îsraêlê li ser
wan bû. 23 Û bilindahiya XU-
DAN ji nav bajêr ve derket û li
ser çiyayê ku li rojhilata bajêr e
sekinî. 24 Û Ruh min rakir û bi
Ruhê Xwedê ve di xewn û xeya-
lê de min anî welatê Kildaniyan,
cem sirgûnan. Û xewn û xeyala
ku dîtim ji ser min ve rabû. 25 Û
hemû tiştên ku XUDAN nîşanî
min dayiye, ji sirgûnan re gotim.

*Çûyîna Sirgûnê bi mînakan tête gîhandin*

12 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 2 Lawê mirov, tu di
hundirê mala asê de rûdinî, bona
dîtinê çavên wan hene û nabînin û
bona bihîstinê guhên wan hene û
nabihîzin; ji ber ku ew malekî asê
ne. 3 Û tu, lawê mirov, ji xwe re
pertalê[1] sirgûntiyê amade bike û li
ber çavên wan bi rojê koç bike û
tuyê ji cîhê xwe berbi cîhekî din
li ber çavên wan koç bike; çawa
ku malekî asê ne, lê belê dibe ku
dîsa jî bibînin. 4 Û tuyê pertalê
xwe, li ber çavên wan mîna per-

[1] Alavên.

talê sirgûntiyê bi rojê derxîne; yên
ku derdikevin sirgûnê çawa bin,
tuyê jî bi wî awayî li ber çavên
wan êvarê derkeve! 5 Tu li ber
çavên wan dîwêr qul bike û ji wir
derxîne. 6 Tuyê li ber çavên wan
wê di pişta xwe de bikişîne û di
tariyê de derxîne; tuyê wecê xwe
buxumîne ku, tu welêt nebîne; ji
ber ku te mîna nîşanekê şiyariyê[1]
danîm mala Îsraêlê!
7 Û çawa emir ji min re hatibe
dayîn, wusa kirim; pertalê xwe
mîna pertalê sirgûnê rojê derxis-
tim û êvarê dîwar bi destê xwe ve
qul kirim; di tariyê de derxistim,
li ber çavên wan di pişta xwe de
kişandim.
8 Û sibehê vê gotina XUDAN ji min
re hat: 9 Lawê mirov, mala Îsraêlê,
ew mala asê qey ji te re: Ma tu çi
dikî, negotin? 10 Ji wan re bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje: Ev
peyxam bona begê ku li Orşelîmê
ye û bona hemû mala Îsraêlê ya ku
li wir rûdininê ye. 11 Bibêje: Ez ji
we re nîşan im; min çawa kiribe, dê
ji wan re jî wusa bête kirin; dê biçin
sirgûnê, dîlitiyê! 12 Û begê ku di
nav wan de ye, dê pertalên xwe di
tariyê de li ser pişta xwe bikişîne û
dê derkeve dervê; bona ku ji dîwêr
ve derxînin, dê wê qul bikin; dê
wecê xwe buxumîne, ji ber ku dê bi
çavên xwe ve welêt nebîne. 13 Û ez
ê tora xwe bi ser wî ve bireşînim û
dê bi dafika min ve bête girtin û ez
ê wî bînim Babîlê, welatê Kildani-
yan û dê li wir bimire, lê belê dê bi
çavê xwe ve wê nebîne. 14 Û ez ê
hemûyên ku li dorê ne û jê re alîkar
in û hemû leşkerên wî bi her bayî
ve berdim û ez ê ji pêy wan ve şûr
bikişînim. 15 Dema ez wan di nav
neteweyan de belav bikim û dema
wan bi welatan ve bireşînim, dê
bizanibin ku ez XUDAN im. 16 Û
di nav neteweyên ku dê werin nav
wan de, bona ku hemû tiştên xwe yî
mekrûh bibêjin, ez ê ji wan zilamên
ku hejmarên wan hindik in ji ber şûr
û xela û webayê ve şûnda bihêlim û
dê bizanibin ku ez XUDAN im!
17 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 18 Lawê mirov, bi leri-
zandinê nanê xwe bixwe û ava
xwe bi çerpîniyê û bi tirsê vexwe;
19 ji neteweya welêt re bibêje:
Bona yên ku li Orşelîmê rûdinin
û bona warê Îsraêlê Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Ji ber zordesti-
ya hemûyên ku li wir rûdinin, bona
ji tiştên ku wê dadigrin welat tenha
bimîne, dê nanên xwe bi tirsê ve
bixwin û avên xwe bi şaşitiyê ve
vexwin. 20 Û bajarên ku zilam
tê de rûdinin, dê xera bibin û dê
welat wêran bibe û hûn ê bizani-
bin ku ez XUDAN im!
21 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 22 Lawê mirov, ev metheloka
ku hûn li warê Îsraêlê, bi gotina:

1 Nîşanekê îkazkirinê.

Roj dirêj dibin û her xewn û xe-
yal vala derdikevin çî ye? 23 Ji
ber vê yekê ji wan re bibêje: Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje: Ez ê
dawiya vê metheloke bînim û êdî
li Îsraêlê wekî metheloke dê ne-
yên gotin, lê belê ji wan re bibêje:
Roj nêzîk in, dê her gotinên pey-
xamberiyê bên cîh[1]! 24 Ji ber ku
êdî dê di hundirê mala Îsrêlê de
qet xewn û xeyalê vala û remilên
çaplûsiyê dikin tune bin. 25 Ji ber
ku ez XUDAN im, ez ê bibêjim
û gotina ku ez ê bibêjim, dê were
kirin; êdî dê dereng nemîne; ji ber
ku ya mala asê, ez ê gotinê di ro-
jên we de bibêjim û ez ê wê bikim,
gotina Xudan, XUDAN.
26 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 27 Lawê mirov, a vay, mala
Îsraêlê: Xewn û xeyala ku wî dîti-
ye bona pirr rojan e û bona demên
ku li dûra ne peyxambertiyê dike,
dibêjin. 28 Ji ber vê yekê ji wan
re bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Êdî dê ji gotinên min qet
yek dereng nemînin, lê gotina ku
ez ê bibêjim dê were kirin, gotina
Xudan, XUDAN.

### *Peyxamberên sexte têne biceza kirin*

Yêr 14,13-16; 23,9-40

13 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov,
li dijî peyxamberên Îsraêlê, ên ku
peyxambertiyê dikin, tu peyxam-
bertiyê bike û ji zilamên ku ji dilê
xwe ve peyxambertiyê dikin re
bibêje: Gotina XUDAN guhdarî
bikin! 3 Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Wey li serê wan peyxam-
berên ehmeq! Ew ku, li pêy ruhên
xwe dimeşin û tiştekî nedîtine!
4 Ya Îsraêl, peyxamberên te bûn
mîna roviyên ku di wêranxaneyan
de ne! 5 Hûn hilnekişiyan qulên
dîwêr û di roja XUDAN de, bona
hûn li cengê bisekinin we ji mala
Îsraêlê re dîwar çênekirin! 6 Yên
ku digotin gotina XUDAN e, li
tiştê vala û li fala derewîn nihêrtin
û XUDAN wan neşand û bi go-
tina dê gotin were cîh, hêviya vala
dan. 7 Û ya ku hûn dibînin, ma ne
xewn û xeyala derewîn û ya ku
hûn dibêjin ne remila derewîn e?
Û hûn dibêjin: Gotina XUDAN e!
Lê belê ez jî, min negot.
8 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Madem ku we tiştê
vala gotin û we derewan dîtin, ji
ber vê yekê, a vay, ez li dijî we
me, gotina Xudan, XUDAN. 9 Û
dê destê min li dijî peyxamberên
ku tiştê vala dibînin û remila de-
rewîn vedikin be; dê ew ê di ci-
vaka netewa min de nebin û dê di
peyîrka mala Îsraêlê de neyên ni-
vîsandin û dê nekevin warê mala
Îsraêlê û hûn ê bizanibin ku, ez

[1] An jî: Roj jî, çêbûna (hatina cîha) her xewn û xeyalî jî nêzîk in!

Xudan, XUDAN im! 10 Madem
ku, belê, madem ku netewa min
bi gotina: Xweşî[1]! ji rê derdixin û
xweşî nîne û dema mirovek dîwar
ava dike, a vay, wê bi heriyê ve
sîwax dikin! 11 Ji yên ku bi heri-
yê ve sîwaxê dikin re bibêje: Dê
dîwar xera bibe! Dê bibe barana
bicoş û ya hûn, hebikên zîpikê ên
girs, hûn ê bibarin û dê bayê ku
diguvêje dîwêr biqelişîne. 12 A
vay, dema dîwar têkbiçe, ma dê ji
we re: Kanê sîwaxa ku we lêxisti-
ne, neyê gotin? 13 Ji ber vê yekê
Xudan, XUDAN wusa dibêje: Ez
ê di hêrsa xwe de wê bi bayê ku
duguvêje biqelişînim û dê di hêr-
sa min de barana bicoş û bona ku
wê biqedîne hebên zîpikê ên ku di
xeydê de girs in hebin. 14 Bi vî
awayî, ez ê dîwarê ku we bi he-
riyê ve sîwax dikirin xera bikim
û ez ê wê bi erdê ve bikim yek
û dê bingeha wê vebe û dê xera
bibe û hûn ê di hundirê wê de he-
laq bibin û hûn ê bizanibin ku, ez
XUDAN im. 15 Û ez ê hêrsa xwe
di dîwêr de û di yên ku sîwaxê lê
dikin de bigehînim serfiraziyê û
ez ê ji we re bibêjim: Dîwar nema
û peyxamberên Îsraêlê ên ku wê
sîwax dikirin neman, 16 ew, yên
ku bona Orşelîmê peyxamberti-
yê dikin û çawa ku xweşî nîne, lê
bona wê xewn û xeyalên xweşiyê
dibînin, gotina Xudan, XUDAN.
17 Û tu, ya lawê mirov, wecê xwe
ji qîzên netewa xwe re, ên ku ji
dilên xwe ve peyxambertiyê dikin
re bizivirîne û li dijî wan peyxam-
bertiyê bike 18 û bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Wey li
serê pîrekên ku bona nêçîra canan
bikin ji her enîşkê re balîfan didu-
rin û bona serê zilamên ku di her
qamê de ne serpûşê[2] çêdikin! Ma
hûn bona ku canên xwe bijînin,
qey nêçîrê li canên netewa min re
dikin? 19 We ji neteweya min re, ji
ya ku li derewan guhdarî dikin re,
bona ku canên dê nemirin bukujin
û canên ku dê bimirin bijînin, de-
rewan gotin û di oxra parîkên nan
û ceha ku di tijîbûna lepan de ye
de, we di nav neteweya min de,
min biçûk xistin!
20 Ji ber vê yekê Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: A vay, ez li dijî
balîfên we me, ew balîfên ku, hûn
li wir bi wan mîna civîkan nêçîra
canan dikin û ez ê wan ji milên we
ve biqetînim û ez ê canên ku we
mîna civîkan nêçîrê li wan dikirin
azad bikim[3]! 21 Ez ê rûpiştên we
jî biçirînim û ez ê netewa xwe ji
destên we xelas bikim û êdî bona
nêçîrê bikin, dê di destên we de
nemînin û hûn ê bizanibin ku,

[1] Aştî.
[2] Çît, çitik, poşî.
[3] Serbest berdim.

ez XUDAN im. 22 Madem ku
we dilê salih ê ku ez bi wê neke-
sirîbûm, bi derewan ve kesirandin
û ji bo canê xwe xelas bike bona
ji rêya xwe yî xerab venegere, we
destên yê xerab xwurt kirin; 23 ji
niha pê ve hûn ê êdî xewn û xe-
yalên vala nebînin û hûn ê remilê
venekin û ez ê neteweya xwe ji
destên we ve xelas bikim û hûn ê
bizanibin ku, ez XUDAN im!

*XUDAN Pûtperestiyê biceza dike*

14 Û zilamên ku ji kalepîrên
Îsraêlê ne, hatin cem min û
li ber min rûniştin. 2 Û vê gotina
XUDAN ji min re hat: 3 Lawê
mirov, van zilaman pûtên xwe di
dilên xwe de çikandin û tilpekiya
fesadiyên xwe danîn ber wecên
xwe; ma ez tu carî xwe bi wan di-
dim gerandin? 4 Ji ber vê yekê bi
wan re biaxife û ji wan re bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje: Ji
her kesê ku ji mala Îsraêlê yê ku
pûtan di dilê xwe de çikandiye û
yê ku tilpekiya fesadiya xwe da-
niye ber wecê xwe û her kesê ku
ji peyxamber re hatiye re, ez XU-
DAN, li gor wê, li gor zêdeyiya
pûtên wan bersivê bidime wî ku,
5 mala Îsraêlê di dilên wan de bi-
girim, ji ber ku gişt bi pûtên xwe
ve ji min re bûn biyan.
6 Ji ber vê yekê ji mala Îsraêlê
re bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Vegerin û xwe ji pûtên
xwe ve vegerînin û wecên xwe,
ji hemû tiştên xwe yî mekrûh ve-
gerînin! 7 Ji ber ku ji mala Îsraêlê
û ji hemû mêvanên ku li Îsraêlê
mêvan in û ji her kesê ku ji min
cuda bûne û pûtên xwe di dilên
xwe de çikandine û tilpekiya
fesadiya xwe danîne ber wecê
xwe û wekî bona xwe li min bi-
gere hatiye cem peyxamber re,
ez XUDAN, ez ê bi xwe bersi-
vê bidim wî 8 û ez ê wecê xwe
li dijî wî zilamî bigirim û ez ê wî
wekî nîşan û metheloke be bikim
tiştekî ku şaş dike û dihêle û ez ê
wî ji nav netewa xwe jêbikim û
bavêjim û hûn ê bizanibin ku, ez
XUDAN im!
9 Û ger peyxamber şaş bibe û
tiştekî bibêje, ez, XUDAN, yê ku
wî peyxamberî şaş kiriye ez im û
ez ê destê xwe bi ser wî ve dirêj
bikim û ez ê wî ji nav netewa xwe
Îsraêlê ve jêbikim û bavêjim. 10 Û
dê ew ê fesadiyên xwe hilgirên; fe-
sadiya yê ku li peyxamber bigere
çawa be, dê fesadiya peyxamber
jî wusa be; 11 da ku, mala Îsraêlê
dîsa ji min çewt nebin û bi hemû
gunehên xwe ve dîsa xwe mindar
nekin û bila ji min re bibin netewe
û ez ji wan re bibim Xwedê, gotina
Xudan, XUDAN.

*Berpirsiyariya Şexsî*

12 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 13 Lawê mirov, dema wela-

tek sûc bike û li dijî min xayîn-
tiyê bike û ez ê destê xwe direjî
ser wê bikim û alîkariya wê yî
nan bişikînim û xelayê bi ser wê
ve bişînim û mirov û heywan ji
wê jêbikim û bavêjim; 14 Nûh,
Danîêl û Eyûb, ev her sê zilam
li wir bin jî, bi rastiya xwe dê
tenê canên xwe xelas bikin, go-
tina Xudan, XUDAN. 15 Ger ez
heywanên xerab ji hundirê welêt
ve derbas bikim û ger wê bêkes
bikin û bête wêran kirin û ji ber
wan heywanan wusa bibe ku, tu
kes jê derbas nebe; 16 ev her sê
zilam tê de bin jî, gotina Xudan,
XUDAN, bona mafê hebûna min,
ne lawan, ne jî qîzan xelas dikin,
tenê ew xelas dibin, lê welat jî dê
wêran bibe!
17 An jî ger ez şûr bi ser wî welatî
ve bînim û jê re, bi gotina: Ya şûr,
ji hundirê welêt ve derbas bibe!
mirov û heywan ji wê jêbikim û
bavêjim; 18 ev her sê zilam di
hundirê wê de bin jî, gotina Xu-
dan, XUDAN, bona hebûna mafê
min, nikarin ne lawan, ne jî qîzan
xelas bikin, lê tenê ew bi xwe bi-
karibin xelas bibin! 19 An jî ez
webayê bişînim wî welatî û bona
mirov û heywan ji wê jêbikim,
hêrsa xwe bi xwîn ve li ser wê bi-
rijînim; 20 Nûh, Danîêl û Eyûb tê
de bin jî, gotina Xudan, XUDAN,
bona hebûna mafê min, nikarin
ne lawan, ne jî qîzan xelas bikin,
bi rastiya xwe, tenê ew ê canên
xwe bikaribin xelas bikin!
21 Ji ber ku Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Hela bona ku ji Orşelîmê
mirov û heywan bibirim dema çar
daraziyên xwe yî giran, şûr û xe-
layê û heywanên xerab û webayê
bi ser wan ve bişînim, dê hîn çi
bibe! 22 Û a vay, dê li wir yên re-
viyane û xelas bûyîne, law û qîz
bên hiştin û dê ji wir bên derxis-
tin; a vay, dê ew ê derkevin cem
we û hûn ê rêyên wan û karên wan
bibînin û ji ber xerabiya ku anîme
ser Orşelîmê, ji ber her tiştên ku
anîme ser wê hûn ê xemrevîn bi-
bin. 23 Û dema hûn rêyên wan û
karên wan bibînin dê xemrevîni-
yê li we bikin û hûn ê bizanibin
ku, her tiştên ku di wê (Orşelîmê)
de kirime bêyî sedem nekirime,
gotina Xudan, XUDAN.

*Orşelîm, Mêwa bêkêr*

Îşa 5,1-7; Yû 15,5-6

15 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 2 Lawê mirov, ma çi
zêdeyiya qîmeta êzingê mêwê ji
her êzingên wekî din û di guliyekî
di nav darên daristanê de ye, heye?
3 Ma bona ku di karekî de bête bi-
karanîn jê êzing tête rahiştin? An
jî bona feraxekî lê daliqînin jê
singê derdixînin? 4 A vay, wekî
tiştekî şewitandinê be wê davêjin
agir, dema agir her du serîkên wê
bixwe û biqedîne û dema naven-

da wê biqemire, ma êdî ji tu karî
re dibe? 5 A vay, dema bitûmî bû,
bi kêra tu tiştî nedihat; hela dema
agir wê xwar û qedand û dema qe-
mirî, ma qey êdî bi kêra tu tiştî tê?
6 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Ji nav darên daristanê
çawa êzingê mêwê wekî tiştekî
şewitandinê be dabim agir, ez ê
yên ku li Orşelîmê rûdinin jî wusa
bidim. 7 Û ez ê wecê xwe li dijî
wan bizivirînim; dê ji agir derke-
vin, lê belê dê agir wan bixwe û bi-
qedîne û dema ez wecê xwe li dijî
wan bizivirînim hûn ê bizanibin
ku, ez XUDAN im. 8 Û ez ê welêt
wêran bikim, ji ber ku xayîntiyê
kirin, gotina Xudan, XUDAN.

*Orşelîma Nedilsoz*
Yêr 2,1-13; Hêz 23

16 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov,
karên wê yî mekrûh ji Orşelîmê
re bighîne 3 û bibêje: Xudan, XU-
DAN ji Orşelîmê re wusa dibêje:
Eslê te û bûyîna te ji welatê Ken-
anê; bavê te Amorî, lê dayika te
jî yeka Hîttî bû. 4 Dema em we-
rin zayîna te, navika te, roja ku tu
bû nehat birrîn û bona ku te paqij
bikin, te bi avê neşuştin û tu bi
xwêyê nehat xwê kirin û qundaxê
li te nepêçiyan. 5 Bona ku li te di-
lovaniyê bike û ji van tiştan yekê
ji te re bike, heyfa çavê tu kesî li
te nehat û ji ber roja ku tu bûyiye
te îkreh kirine tu bi wecê beyarê
ve hate avêtin.
6 Û ez ji cem te ve derbas bûm û te
di nav xwîna te de di gingirandinê
de dîtim û ji te re gotim: Di nav
xwîna xwe de bijî! Belê, ji te re
gotim: Di nav xwîna xwe de bijî!
7 Te mîna tiştên ku di zeviyê de
digihêjin zêde kirim û te qam avêt
û mezin bû û tu bû xemla xemlan;
pêsîrên te derketin û porê te dirêj
bû û tu vekirî û tazî bû. 8 Û ez ji
cem te re derbas bûm û te dîtim, a
vay, çaxa te çaxa evînê bû û dawa
xwe li ser te raxistim û tazîbûna
te nuxumandim û ji te re sondê
dam û bi te re ketim peymanê.
Gotina Xudan, XUDAN û tu bû
ya min. 9 Û te bi avê ve şuştim
û ji ser te bitûmî bitûmî xwîna te
paqij kirim û te bi rûnê rûn kirim.
10 Û kincê reng bi rengî hatiye
neqiş kirin li te kirim û çarixê ji
çermê delfînê li lingên te kirim
û şûtika ji kitana tenik li pişta te
girêdam û hevrîşiman li te kirim.
11 Û bi xemlan te xemilandim û
bazinan xistim destê te û gerdeni-
yan xistim histuyê te. 12 Û xelikan
xistim pozê te û guharan xistim
guhên te û taca xweşikiyê danîm
serê te. 13 Û te bi zêr û zîv xwe
xemiland û kincê te kitana tenik
û hevrişîm û reng bi reng qumaşê
neqşandî bû; te arvanê zirav û
hungiv û rûn xwarin û tu zehf,
zehf xweşik bû û tu li qiraletiyê

hat. 14 Û ji ber xweşikiya te di nav
neteweyan de navê te derket; ji ber
ku bi semyana min ya ku danîbûm
ser te xweşikiya te bêqisûr bû,
gotina Xudan, XUDAN.
15 Lê belê tu bi xweşikiya xwe ve
ewle bû û te ji ber nav û dengê xwe
fahîşetiyê kir û te fahîşetiyên xwe
li ser her zilamê ku ji rê ve derbas
dibin rijand; bû ya wî. 16 Û te ji
kincê xwe rahişt û ji xwe re cîhên
bilind ên reng bi rengî ava kir û te li
ser wan fahşetiyê kir; tiştê ku nebe
û tiştê ku nabe. 17 Û te ji hemû
zêr û zîvê ku dame te xişirên xwe
yî xweşik rahişt û te ji xwe re se-
nemên zilaman çêkir û te bi wan re
fahîşetiyê kir 18 û te kincê xwe yî
reng rengî rahişt û te bi wan nuxu-
mand û te rûnê min û buxura min
danî ber wan. 19 Nanê ku dabûm
te, arvanê zirav û rûn û hungivê ku
bi te dabûm xwarin, te vana jî wekî
bibin bêhna xweş danîn ber wan
û belê, wusa bû! Gotina Xudan,
XUDAN. 20 Û law û qîzên ku te
bona min aniye dinê rahişt û bona
ku bibin xwarin te ji wan re kirin
qurban. Ma gelo fahîşetiyên te hin-
dik in ku; 21 te zarokên min jî serjê
kir û te wan ji agir ve derbas kir
û da wan? 22 Û te di hemû tiştên
xwe yî mekrûh de û di fahîşetiyên
xwe de rojên ciwantiya xwe di bîra
xwe de neanî, wê çaxê ku, tu tazî û
vekirî bû û tu di xwîna xwe de di
gindirandinê de bû.
23 Û wusa bû ku, paşî hemû xe-
rabiya te, wey, wey li serê te!
Gotina Xudan, XUDAN, 24 te ji
xwe re gumbet çêkir û li her qadê
ji xwe re cîhê bilind çêkir. 25 Te
li serê her rêyê ji xwe re cîhê xwe
yî bilind çêkir û te xweşikiya xwe
kir tiştekî mekrûh û te lingên xwe
ji her zilamê ku ji rêyê derbas
dibe re vekir û te fahîşetiya xwe
zêde kir. 26 Û te bi cîranên xwe
yî goştên wan zêde ne, bi lawên
Misirê re fahîşetiyê kir û bona ku
tu min hêrs bike, te fahîşetiya xwe
zêde kir. 27 Û a vay, destê xwe bi
ser te re dirêj kirim û zewêdeya te
kêm kirim û yên ku ji te dikerihin,
qîzên Filistiyan bona xwestina
xwe bikin, te dam wan, ew ku, ji
rêya te ya bêheyatiyê şerm dikin.
28 Te bi lawên Asûr re jî fahîşetiyê
kir, ji ber ku tu têr nedibû; te bi
wan re jî fahîşetiyê kir û dîsa tu
têr nebû. 29 Û te heta warê danû-
stendinê, heta welatê Kildaniyan
fahîşetiya xwe zêde kir; dîsa bi
vêya re jî tu têr nebû.
30 Dilê te çiqas helisiye ku, go-
tina Xudan, XUDAN, te li serê
her rêyê çêkirina gumbeta xwe û
li her qadê bi avakirina cîhên xwe
yî bilind, 31 tu hemû van tiştan,
karên fahîşeya ku şerm nake dike
û di mîşeyê biçûk dîtinê de tu
ne mîna fahîşeyekê ye jî. 32 Tu
pîrekek zinê dike û li dêvila mêrê
xwe biyanan radihêje yî! 33 Xela-

tan didin hemû fahîşeyan; lê belê
tu xelatan dide hemû leyistokên
xwe û bona ji bo fahîşetiya te ji
her alî ve werin cem te, tu bertîlê
dide wan. 34 Û tu di fahşetiyên
xwe de ne mîna pîrekên wekî din
e, ji ber bona fahşetî kirinê tu kes
bi pêy te nakeve û madem ku yê
mîşeyê dide tu yî û ji te re mîşe
nayê dayîn, bo vê yekê tu ne mîna
tu kesî ye.
35 Ji ber vê yekê ya fahîşe, gotina
XUDAN guhdarî bike! 36 Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Ji ber ku
bêheyatiya te li qadê hate rijandin[1]
û ji ber ku bi leyistokên te re bi
fahşetî kirina te tazîbûna te vebû û
ji ber hemû pûtên karên te yî mek-
rûh û ji ber xwîna lawên te yî te
daye wan; 37 a vay, ji ber vê yekê
ez ê hemû leyistokên te yên ku tu
bi wan re şa dibû û hemûyên ku tu
ji wan hez dikî tevî hemûyên ku tu
ji wan dikerihî pev re bidim hev;
ez ê wan bi dor û ber li hemberî te
bidim hev û ez ê ji wan re tazîbû-
na te vekim û dê hemû tazîbûna te
bibînin. 38 Û bi daraziya ji pîreka
ku zinê dike û xwîn dirijîne ez ê
daraziyê li te bikim û ez ê bi hêrs
û bi çavnebariyê daraziya xwînê
bi ser te ve bînim. 39 Û ez ê te
bidim destên wan û dê gumbeta
te hilweşînin û cîhên te yî bilind
xera bikin û dê kincên te ji te bikin
û dê xişirên te yên xweşik rahêlin
û dê te tazî û vekirî bihêlin. 40 Û
dê li dijî te civatekê derxînin û dê
bi keviran te birecimînin û dê bi
şûrê xwe te qul qulî bikin. 41 Û dê
xaniyên te bi agir ve bişewitînin
û li ber çavên gellek pîrekan dê li
ser te daraziyê bikin û ez ê dawiyê
bidim fahîşetiyên te û êdî tuyê jî
mîşeya fahşetiyê nede. 42 Û bi vî
awayî ez ê xezeba xwe ya li ser te
aş bikim û dê çavnebariya min ji
ser te rabe û ez ê hiş bim û êdî ez
ê hêrs nebim. 43 Madem ku te ro-
jên ciwantiya xwe di bîra xwe de
neanîn û di hemû van karên xwe
de li dijî min tu hêrs bû; a vay, ez
ê jî rêya te bînim serê te, gotina
Xudan, XUDAN û tuyê tevî hemû
karên xwe yî mekrûh vê bêheya-
tiyê neke.
44 A vay, her kesê ku methelokê
dibêjin dê li dijî te vê methelokê
bibêjin: Dayika wê çawa be, qîza
wê jî wusa ye. 45 Tu, qîza dayika
ku ji zilamê xwe û ji lawên xwe
ve dikerihe yî û xwuşka xwuşkên
ku ji zilamê xwe û ji lawên xwe
ve dikerihine; dayika we Hîttî û
bavê we Amorî bû. 46 Û xwuşka
te yî mezin, ew bi xwe û qîzên
wê, Samîriya ku li aliyê te yî çepê
rûniştiye yî û xwuşka te yî ji te
biçûktir jî Sodom û qîzên wê yên
ku li aliyê te yî rastê rûniştine yî.
47 Lê belê tu tenê di rêyên wan
de nemeşiya û li gor karên wanî

[1] An jî: Eşkere hate dîtin.

mekrûh nekir; wekî tiştekî biçûk
be, di hemû rêyên xwe de tu ji
wan ve xerabtir bû. 48 Bona mafê
hebûna min, gotina Xudan, XU-
DAN, xwuşka te Sodom, ew bi
xwe û qîzên wê, mîna ku te bi
qîzên xwe re kirine nekirin! 49 A
vay, xerabiya xwuşka te Sodom
ev bû: Di wê de û di qîzên wê de
kubr, ji nan têr bûn û rehetiya bê
xem hebû û destê zebûn û xizan
nezeximandin. 50 Û bi kubrê ve
ketin û li ber min tiştê mekrûh ki-
rin û dema vêya dîtim wan ji holê
rakirim. 51 Û Samîriye nêviyê
sûcên ku te kiriye, nekir û te tiştên
xwe yî mekrûh ji wan zêdetir pirr
kir û bi kirina hemû tiştên xwe
yî mekrûh xwuşkên xwe bi heq
derxist! 52 Tu jî şermezariya xwe
hilgirê, ji ber ku te ji bo xwuşkên
xwe daraziyê da; ji sûcên ku te ji
wan zêdetir mekrûh kirine, ew ji
te salihtir in; belê, tu jî şerm bike û
şermezariya xwe hilgire, ji ber ku
te xwuşkên xwe bi heq derxist!
53 Û ez ê sirgûnên wan, sirgûnên
Sodom û qîzên wê û sirgûnên
Samîriyê û qîzên wê û di nav wan
de sirgûnên te şunda bînim, 54 da
ku, tu şermezariya xwe hilgire û ji
her tiştên ku te kiriye şerm bike,
ji ber ku tu ji wan re bû xemre-
vînî. 55 Û dê xwuşkên te Sodom
û qîzên xwe vegerin rewşa xwe yî
kevn û dê Samîriye û qîzên xwe
vegerin rewşa xwe yî kevn û tu
û qîzên te, hûn ê vegerin rewşa
xwe yî kevn. 56 Û qîzên Sûri-
yê û hemûyên ku li dora wê ne,
qîzên Filistî yên ku ji her alî ve
te biçûk dibînin, dema mîna gazin
li wan tête kirin, berî ku xerabiya
te vebe, 57 di roja xwe yî xirûrê
de xwuşka te Sodom ji devê te ve
nehat bihîstin. 58 Tiştên xwe yî
mekrûh û bêheyabûna xwe te hil-
girt, gotina XUDAN. 59 Ji ber ku
Xudan, XUDAN wusa dibêje: Tu
ku, te peymanê xera kir û sondê
biçûk dît, te çawa kiribe, ez ê ji
wusa bikim.
60 Lê belê ez ê peymana xwe
ya ku di rojên te yî ciwantiyê de
bi te re kiribûm, di bîra xwe de
bînim û ez ê bona te peymana
abadîn bizexmînim. 61 Û dema
tu xwuşkên xwe yî ji xwe biçûk û
mezin bigire cem xwe, tuyê rêyên
xwe di bîra xwe de bîne û şerm
bike û bona ku bibin qîzên te, ez
ê wan bidim te, lê ne bi peyma-
na te. 62 Û dema her tiştên ku te
kiriye li te biborînim, ji bo tu di
bîra xwe de bîne û bişerme û ji
ber şermezariya xwe careke din
devê xwe veneke, 63 ez ê bi te re
peymana xwe bizexmînim û tuyê
bizanibe ku, ez XUDAN im, go-
tina Xudan, XUDAN.

*Çîroka mînakî ya Qertel û Mêwê*

17 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Ya lawê mi-

rov, tiştonekekê ji mala Îsraêlê
re biaxife û methelokekê bibêje
3 û bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Qertelek[1] gir yê bazi-
kên wê mezin û xwurt, ser wê bi
perîkên reng rengî tijî, hate Lub-
nanê û serê darê erzê stend; 4 serê
ajên wê yî teze jêkir û wê bir warê
danûstendinê; wê xist bajarê ba-
zirgan. 5 Û ji tovê wî warî rahişt û
wê li erdê bi hilbere çand; wê danî
qeraxa pirr avan; mîna darê biyê
wê çikand. 6 Û bû mêwa cureya
aj dide û li erdê belav dibe û gu-
liyên wê berbi wê zivirîn û rehên
wê di bin wê de bûn û bû dêlî û
şivikan da û ajan berda.
7 Qertelekî din yê gir û bazikên wê
mezin û perîkên wê zêde ne hebû
û a vay, mêw rehên xwe berbi wê
ve zivirand û ji mişareyên ku bona
avê bidinê hatiye çandin guliyên
xwe berbi wê ve berda. 8 Bona
guliyan bide û mêwî derxîne, bona
bibe dêliyek xweşik, li qeraxa pirr
avan, di axa qenc de hate çikandin!
9 Bibêje ku: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Gelo dê dêlî bi pêşkeve?
Bona ku hişk bibe û bona ku hemû
pelên wê yên nû aj dane hişk bibin,
dê wê ji rehê ve raneke û dê mêwê
wê jê neke? Ne bi bazûya bi quwet,
ne jî bi zêdebûna gel ji rehên xwe
ve tête rakirin. 10 A vay, gelo ya ku
hatiye çikandin, dê pêş ve bikeve?
Dema bayê rojhilatê lê bikeve, dê
bitûmî bitûmî hişk nebe? Belê, di
mişareyên gîhaştiye de hişk bibe.

*Çîroka mînakî tê daxuyanî kirin*

11 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 12 Niha ji wê mala asê're bi-
bêje: Gelo ev tiştan çi ne, ma hûn
pê nizanin? Ji wan re bibêje: A
vay, qiralê Babîlê hate Orşelîmê
û qiralê wê û serokên wê rahişt û
wan bir Babîlê, cem xwe. 13 Û
yekî ku ji nîjada qiral e rahişt û bi
wî re peymanê birrî û bi wî sond
da xwarin, zilamên zordest ên
welêt jî birin ku, 14 bila qiraletî
kêm bibe, bilind nebe, lê belê bila
bi sonda xwe bigire û li cîhê xwe
ve bisekine. 15 Lê belê bona hes-
pan û gellek leşkeran bidin wî,
şandiyên xwe şand Misirê û li dijî
qiralê Babîlê serî hilda; ma gelo
qet karê wî qenc diçe? Ma yê ku
van tiştan dike, xelas dibe? Ma
yê ku peymanê xera bike, xelas
dibe? 16 Bona hebûna mafê min,
gotina Xudan, XUDAN, dê li
cem yê ku wî kiriye qiral, li cîhê
wî qiralê ku, ew sonda wî biçûk
dîtiye û peymana wî xera kiri-
ye, di hundirê Babîlê de, bimire!
17 Û dema bona pirr canan jêbikin
û bavêjin meterîsan kom bikin û
bircan ava bikin, dê Fîrawûn bi
artêşa xwe yî xwurt û bi civaka
xwe yî mezin di cengê de alîka-
riyê bi wî re neke. 18 Ji ber ku bi

[1] Helo, eylo, hilo, daraş.

xera kirina sondê peymanê biçûk
dît û a vay, çawa ku destê xwe
dayîbû, lê dîsa hemûyên van ka-
ran kirin û dê ew ê nikaribe bire-
ve û xelas bibe[1]. 19 Ji ber vê yekê
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Bona mafê hebûna min, bi rastî,
ez ê sonda min ya ku biçûk dîti-
ye û peymana min ya xera kiriye
bînim serê wî. 20 Û ez ê tora xwe
bi ser wî ve bireşînim û dê bikeve
dafika min û ez ê wî bînim Babîlê
û ji ber xayîntiya ku li dijî min ki-
riye li wir ez ê bi wî re bêm darazî
kirin. 21 Û di nav hemû leşkerên
wî de hemû revokên wî dê bi şûr
ve bikevin û yên ku jibermayîne,
dê bi her bayî ve belav bibin û
hûn ê bizanibin ku, ez XUDAN,
min got.
22 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ez ê jî ji serê darê erzê yê bilind
rahêlim û ez ê wî bicîh bikim; ez ê
ji serê ajên wê, ajekî teze jêbikim
û ez ê wê li ser çiyayekî bilind û
mezin ve biçikînim. 23 Ez ê wê li
çiyayê bilind ya Îsraêlê biçikînim
û dê guliyan bighîne û mêwan
bide û dê bibe darekî xweşik ya
erzê; bi her celebî civîkên bi ba-
zik, dê di bin wê de star bibin[2],
dê di sîha guliyên wê de bisitirin.
24 Û dê hemû darên beyarê biza-
nibin ku, ez, XUDAN, min darê
bilind nizm kir, darê nizm bilind
kir, darê hêşîn hişk kir û darê hişk
hêşîn kir; ez, XUDAN, min got û
min kir.

*Berpirsiyariya Şexsî*

Yêr 31,29-30; Rom 2,1-16; 1.Pêt 1,17

18 Û dîsa vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Hûn bi gotina:
Bavan hersimê xwarin û diranên
lawan sekihîn ji warê Îsraêlê vê
methelokê dibêjin, gelo hûn bi
gotina vê methelokê dixwazin
çi bibêjin? 3 Bona mafê hebûna
min, gotina Xudan, XUDAN,
êdî hûn ê li Îsraêlê vê methelokê
nebêjin! 4 A vay, hemû can yên
min in, mîna ku canê bav yê min
e, canê law jî yê min e; canê ku
sûcê dike, yê ku bimire ew e.
5 Û zilamek ku, ger salih be û yê
heq û yê rast bike 6 û li ser çiya-
yan nexwe û çavên xwe li pûtên
mala Îsraêlê ve raneke û jina
cîranê xwe mindar nake û dema
pîrek gemarî be, nêzîkî wê nabe
7 û neheqiyê li tu kesî nake û tenê
mişkaneyê deyndar şunda dide û
şelandinê[3] nake û nanê xwe dide
yê ku birçî ye û kincan li yê ku ta-
ziye dike 8 û bi selefê pere nade û
kara zêdeyiyê ranahêje, destê xwe
ji xerabiyê ve diparêze, di nav du
zilamî de li gor rasteqîniyê dadiyê

1 Nereve û xelas nebe, an jî: Xelas nebe.
2 Bisitirin, bimînin.
3 Rêbiriyê.

dike, 9 di zagonên min de dimeşe
û bona ya heq bike bi daraziyên
min ve digire; yê ku salih e ew e,
helbet ku dê bijî, gotina Xudan,
XUDAN.
10 Lê belê ger ev zilama bibe
bavê lawê ku zordestiyê dike,
xwînê dirijîne û ji vana yekî dike
û ji wan wezîfeyan qet yekî nake,
11 lê li ser çiyayan dixwe û jina
cîranê xwe mindar dike, 12 yê ku
neheqiyê ji zebûn û ketî re dike,
şêlînkirinê dike, mişkaneyê şunda
nade û yê ku çavên xwe li pûtan
ve radike, tiştê ku mekrûh e dike,
13 bi selefê pere dide û kara yê
zêde radihêje, ma dê ew lawê wî
bijî? Dê ew ê nejî! Hemû van
tiştên mekrûh kiriye; helbet dê bi-
mire; dê xwîna wî li ser wî be.
14 A vay, dê laweki viya jî bibe û
hemû sûcên ku bavê wî kirine, dê
bibîne û dê bitirse û tiştên ku mîna
vê yekê ne, dê neke; 15 ger li ser çi-
yayan nexwe û çavên xwe li pûtên
mala Îsraêlê ve raneke, jina cîranê
xwe mindar neke 16 û ji tu kesî
re neheqiyê neke, bi mişkaneyî
nestîne û şêlînkeriyê neke, lê tenê
nanê xwe bide yê birçî û kincan
li yê tazî bike 17 û destê xwe ji
yê zebûn bikişîne, selef û kara yê
zêdeyiyê nestîne, daraziyên min
bike û di zagonên min de bimeşe,
ew ji ber fesadiya bavê xwe nami-
re, helbet dê ew ê bijî. 18 Lê bavê
wî jî ji ber ku bi bêînsafî xedariyê
kiriye, şêlînkeriya birayê xwe ki-
riye û di nav neteweya xwe de ya
neqenc e kiriye, a vay, yê ku dê di
fesadiya xwe de bimire ew e!
19 Lê belê hûn: Ma çima law
fesadiya bavê xwe nekişîne?
dibêjin. Law yê heq û rast e kir
û bi hemû zagonên min ve girt û
wan kir; helbet dê bijî! 20 Canê
ku sûc kiriye, yê ku bimire ew e;
law fesadiya bavê xwe nakişîne û
bav fesadiya law nakişîne; bawe-
riya yê salih dê li ser wî be, xera-
biya yê xerab jî dê li ser wî be!
21 Û ger zilamê xerab ji hemû
sûcên ku kiriye vegere û bi hemû
zagonên min ve bigire û ya heq
û rast bike, helbet dê bijî, dê ne-
mire. 22 Dê ji tu gunehên ku ki-
riye, li dijî wî neyê bîranîn; dê di
rastiya ku kiriye de bijî! 23 Gelo
ez ji mirina zilamê xerab zewqê
digirim; ma ne zêdetir ew ji rêyên
xwe vegere û bijî? Gotina Xudan,
XUDAN. 24 Lê belê ger zilamê
salih ji rastiya xwe vegere û li gor
hemû tiştên mekrûh ên zilamê xe-
rab kiribe xerabiyê bike, gelo dê
bijî? Dê hemû karên wî yên rast ên
ku wî kirine, qet neyên bîranînê; di
xayîntiya ku kirine de û di sûcê ku
kirine de, dê di wan de bimire!
25 Lê belê hûn: Rêya Xudan ne
rast e, dibêjin. Ya mala Îsraêlê,
niha guhdarî bikin: Gelo rêya min
ne rast e? Ma yên ne rast ne rêyên
we ne? 26 Ger zilamê salih ji ras-

tiya xwe vegere û xerabiyê bike û
di wan de bimire, di xerabiya ku
kiriye de dê bimire. 27 Zilamê
xerab jî ger ji xerabiya ku kiriye
vegere û ya heq û ya rast bike, ew
zilam canê xwe dijîne. 28 Madem
ku ew dibîne û ji hemû gunehên
xwe yên ku kiriye vedigere, helbet
dê bijî, dê nemire. 29 Lê belê mala
Îsraêlê: Rêya Xudan ne rast e,
dibêjin. Ya mala Îsraêlê, ma rêyên
min ne rast in? Ma yê ne rast e, ne
rêyên we ne? 30 Ji ber vê yekê, ya
mala Îsraêlê, ez ê ji we re, ji her
kesî re li gor rêyên wan daraziyê
bikim, gotina Xudan, XUDAN.
Vegerin û xwe ji hemû gunehên
xwe vegerînin ku, bila fesadî we
nexîne helaqê! 31 Hemû gunehên
ku we kirine ji ser xwe ve bavêjin
û ji xwe re dilekî nû û ruhekî nû
çêbikin û ma çima hûn ê bimirin,
ya mala Îsraêlê? 32 Ji ber ku ez ji
mirina zilamê ku dê bimire kêfê
nastînim, gotina Xudan, XUDAN;
ger wusa be vegerin û bijîn[1]!

*Lawijên bona Serokên Îsraêlê*

19 Û bona begên Îsraêlê lawi-
jê bixwîne 2 û bibêje: Ma
dayika te çi bû? Şêrekî mê! Ew
di nav şêran de radiket, di nav
şêrên ciwan de çêlikên xwe xwe-
dî dikir. 3 Û ji çêlikên xwe yekî
xwedî kir; ew bû şêrekî ciwan û
hînî rahiştina nêçîrê bû; zilaman
dixwar. 4 Û neteweyan agahiya
wî bihîstin; di kortala wan de hate
girtin û çanqilan li devê wî xistin
û wî anîn warê Misirê. 5 Û dema
dît ku li cîhê vala disekine û hêvî
nemaye, ji çêlikên xwe yekî din
rahişt û wî jî kir şêrekî ciwan. 6 Û
di nav şêran de digeriya; bû şêrekî
ciwan û hînî rahiştina nêçîrê bû;
wî zilaman dixwar. 7 Û hînî qes-
rên wan bû û bajarên wan xera kir
û bajar û yên ku di hundirê wê de
ne ji dengê gurmîniya wî tenha
man. 8 Û ji welatên hember dorê
netewe li dijî wî sekinîn û torên
xwe li ser wî ve reşandin û di kor-
tala wan de hate girtin. 9 Û çinqal[2]
li devê wî xistin û wî xistin qefesê
û wî ji qiralê Babîlê re anîn û bona
ku êdî dengê wî li ser çiyayên Îs-
raêlê neyê bihîstin wî anîn hun-
dirê bircan.
10 Dayika te mîna te, wekî mêwek
be, li qeraxa avan hatibû çikandin;
ji ber pirr avan bi hilberdar bû, gu-
liyên wê zêde bû. 11 Û bona ku
bibe asayê yên ku serweriyê bajon,
şivên wê yî xwurt hebûn û qama
wê heta nava ewran direj bû û di
bilindahiya xwe de bi zêdeyiya gu-
liyên xwe ve hate dîtin. 12 Lê belê
bi xeyd wê ji cîh rakirin, avêtin erdê
û bayê rojhilatê mêwê wê hişk kir;
şivên wê yên xwurt hatin jêkirin û

1 An jî: Ji gunehên xwe vegerin û bijîn!
2 Xeleqa ku davêjin pozê dewaran.

hişk bûn, agir wan xwar û qedand.
13 Û niha li çolê li warê ziwa û bê
av hate çikandin. 14 Û ji şivekî
guliyên wê agir derket, mêwê wê
xwar û qedand û bona ku serweri-
yê bajo di wê de şivê xwurt nema.
Ev lawij e û dê bi lawijî bimîne.

*Li ser Rêyên Îsraêlê yên çewt*
Neh 9,9-28; Zeb 106,1-40

20 Û di sala heftemîn de, di
meha pêncan de, di roja
dehemîn ya mehê de wusa bû
ku, ji kalepîrên Îsraêlê hinek kes
bona ku li XUDAN bigerin ha-
tin û li ber min rûniştin. 2 Û vê
gotina XUDAN ji min re hat:
3 Lawê mirov, bi kalepîrên Îsraêlê
re biaxife û ji wan re bibêje: Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje: Ma
hûn bona ku li min bigerin hatin?
Bona mafê hebûna min, gotina
Xudan, XUDAN, ez ê nehêlim ku
hûn ji min bipirsin[1]! 4 Ma tuyê li
wan darizînê bike, ya lawê mirov,
darizînê bike? Karên bapîrên wan
ên mekrûh ji wan re bibêje 5 û ji
wan re bibêje: Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Di roja ku Îsraêlê
bijartime û ji nîjada Aqûp re son-
dê dayîme de û di warê Misirê de
xwe ji wan re gotime û di roja ku
ji wan re bi gotina: Ez Xwedayê
we XUDAN im, sondê ji wan re
dayîme de; 6 di wê rojê de sondê
ji wan re dam ku ez ê wan ji warê
Misirê derxînim welatê ku bona
wan lêkolînê lê kirime û xemla
hemû welatan e, welatê ku şîr û
hungiv jê diherike. 7 Û ji wan re
gotim: Bila her kes tiştên sik ên
çavên xwe bavêjin û bi pûtên Mi-
sirê xwe mindar nekin; ez Xwe-
dayê we XUDAN im. 8 Lê belê
ew li dijî min asê bûn û nexwestin
ku min guhdarî bikin; tu kesî ji
wan tiştên sik ên çavên xwe nea-
vêtin û dev ji pûtên Misirê berne-
dan. Û gotim ku bona di hundirê
warê Misirê de li dijî wan hêrsa
xwe serfiraz bikim ez ê xeyda
xwe bi ser wan ve birijînim. 9 Lê
belê bona ku di çavên neteweyên
ku ew di nav wan de ne de navê
min xera nebe, ez di oxra navê
xwe de xebitîm; ew neteweyên
ku, li ber çavên wan lawên Îsraêl
ji Misirê derxistim û bi vî awayî
xwe ji wan re agihandim.
10 Û wan ji warê Misirê derxis-
tim û anîm çolê. 11 Û zagonên
xwe dam wan û daraziyên xwe
agahî wan kirim, ew daraziyên ku
ger mirov wan bike, dê bi wan ve
bijî. 12 Bona bizanibin ku XU-
DANê wan pîroz kiriye ez im,
wekî di nav wan û min de bibe
nîşanek Sebtên xwe jî dam wan.
13 Lê belê mala Îsraêlê li çolê li
dijî min bûn asê; di zagonên min

[1] Ez ê nehêlim ku hûn ji min bişêwirîn, an jî: Ez nahêlim ku hûn li min bigerin!

de nemeşiyan û daraziyên min ji
xwe avêtin, ew daraziyên ku ger
mirov wan bike, dê bi wan ve bijî
û Sebtên min bitûmî xera kirin.
Û gotim: Bona ku ez wan li çolê
biqedînim, ez ê xeyda xwe bi ser
wan ve birijînim. 14 Lê belê bona
di çavên neteweyan de navê min
xera nebe, ez di oxra navê xwe
de xebitîm; ew neteweyên ku, li
ber çavên wan lawên Îsraêl der-
xistibûm. 15 Û min jî bona ku ez
ê wan neynim warê xelata hemû
welatan, warê ku şîr û hungiv
jê diherike û dame wan, li çolê
sondê dam wan; 16 ji ber ku da-
raziyên min ji xwe avêtin û di za-
gonên min de nemeşiyan û Seb-
tên min xera kirin; ji ber ku dilên
wan li pêy pûtên wan dimeşiyan.
17 Lê belê çavên min wan paras-
tin û wan helaq nekirim û di çolê
de bitûmî dawiya wan neanîm.

18 Û li çolê ji lawên wan re go-
tim: Di zagonên bapîrên xwe de
nemeşin û bi daraziyên wan ve
negirin û bi pûtên wan xwe min-
dar nekin. 19 Ez Xwedayê we
XUDAN im; di zagonên min de
bimeşin û bi daraziyên min ve
bigirin û wan bikin 20 û Sebtên
min pîroz bikin û bona ku hûn bi-
zanibin Xwedayê we XUDAN ez
im, dê ew ê di navbera we û min
de bibin nîşan. 21 Lê belê law li
dijî min asê bûn, di zagonên min
de nemeşiyan û bona ku bikin bi
daraziyên min ve negirtin, ew da-
raziyên ku ger mirov wan bike,
dê bi wan ve bijî; Sebtên min xera
kirin. Û bona ku di çolê de li dijî
wan hêrsa xwe serfiraz bikim ez
ê xeyda xwe bi ser wan ve birijî-
nim, gotim. 22 Tevî vê yekê bona
di çavên neteweyan de navê min
xera nebe, ez di oxra navê xwe de
xebitîm; ew neteweyên ku, li ber
çavên wan lawên Îsraêl derxis-
tibûm. 23 Û bona ku ez ê wan di
nav neteweyan de belav bikim û
ez ê wan li welatan ve biweşînim,
li çolê sondê li wan xwarim; 24 ji
ber ku daraziyên min nekiribûn û
zagonên min ji xwe ve avêtibûn û
Sebtên min xera kiribûn û çavên
wan di pûtên bapîrên wan de bûn.
25 Û min jî zagonên ku ne qenc
in û daraziyên ku nikarin bi wan
re bijîn dan wan. 26 Û bona ku ez
wan xera bikim û bila bi XUDAN
bûna min bizanin, bi pêşkêşiyên
ku her yê nû hatiye dinê ji agir
derbas dikin û bi vî awayî pêşkêş
dikin wan mindar kirim.

27 Ji ber vê yekê bi mala Îsraêlê
re biaxife ya lawê mirov û ji wan
re bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Çawa ku li dijî min xayîn-
tiyê dikin bapîrên we bi vêya jî
kufrê li min kirin. 28 Ji ber ku
dema wan anîm welatê ku bona
ez bidim wan sondê dayîme, wê
çaxê her girê bilind û her darê gu-
liyên wê pihêt in dîtin û qurbanên

xwe li wir jêkirin û qurbanên xwe
yî hêrsê sor dike li wir pêşkêş ki-
rin û bêhnên xwe yî xweş danîn
wir û pêşkêşiyên xwe yî rijan-
dinê li wir rijandin. 29 Û ji wan
re gotim: Ew cîhê bilindê ku hûn
diçinê çî ye? Û heta niha bi navê
cîhê Bilind hate bang kirin.

*Darazî û Bexşandin*

30 Ji ber vê yekê ji mala Îsraêlê
re bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Gava hûn di rêya bapîrên
xwe de xwe di mindar kirinê
de bûn û li paş tiştên wanî sik di
fahşetî kirinê de 31 û heta îroj bi
pêşkêşî kirina pêşkêşiyên xwe ve,
law û qîzên xwe ji agir ve derbasî
kirinê de, bi hemû pûtên xwe, xwe
di mindarî kirinê de bûn, ez jî, ya
mala Îsraêlê, ma ez xwe bi we di-
dim gerandin? Bona mafê hebûna
min, gotina Xudan, XUDAN, ez ê
xwe bi we nedim gerandin! 32 Û
tiştê ku bi gotina: Ji dar û kevirê re
xizmet kirinê em ê jî bibin mîna ne-
teweyên din, mîna eşîrên li welatên
din in[1] ji aqilê we derbas dibe, hel-
bet dê ev nebe!
33 Bona mafê hebûna min, go-
tina Xudan, XUDAN, bi rastî, li
ser we bi destê bihêz û bi bazûya
ku hatiye dirêj kirin û bi hêrsa ku
ji ser xwe ve çûye ez ê qiraletiyê
bikim! 34 Û bi destê bihêz û bi
bazûya ku hatiye dirêj kirin û bi
hêrsa ku ji ser xwe ve çûye, ez ê
we ji nav neteweyan ve derxînim
û ji welatên ku hûn li wan belav
bûyîne ez ê we bidim hev 35 û
ez ê we bînim çola neteweyan û
ez ê li wir bi we re rû bi rû bêm
darizdan. 36 Ez bi bapîrên we li
çola warê Misirê çawa hatibim
darizdan; bi we re jî ez ê wusa bêm
darizdan, gotina Xudan, XUDAN.
37 Û ez ê we ji bin çoyê ve der-
bas bikim û ez ê we bi peymanê
ve girê bidim 38 û ez ê yên asê û
yên li dijî min guneh kirine ji we
cuda bikim; ji welatê ku lê mêvan
in ez ê wan derxînim, lê belê dê
nekevin welatê Îsraêlê û hûn ê bi-
zanibin ku, ez XUDAN im. 39 Û
hûn, ya mala Îsraêlê, Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Herin, bila her
kes ji pûtên xwe re qûlitiyê bikin;
lê ji niha pê ve hûn ê bi rastî jî min
guhdarî bikin û bi pêşkêşiyên xwe
û bi pûtên xwe carekî din hûn ê
navê minî pîroz xera nekin.
40 Ji ber ku li çiyayê minî pîroz,
li çiyayê bilind yê Îsraêlê, gotina
Xudan, XUDAN, hemûya mala
Îsraêlê, dê gişt li wî welatî ji min
re qûlitiyê bikin; ez ê li wir ji wan
razî bibim û ez ê li wir tevî hemû
tiştên we yî pîroz li pêşkêşiyên we
û li nûberên xelatên we bigerim.
41 Dema we ji nav neteweyan
derxînim û ji welatên ku hûn li wan
belav bûyîne we bidim hev, wekî

[1] An jî: Mîna gelên welatên din.

bêhna xweş bigirim ez ê ji we razî
bibim û li ber çavên neteweyan ez
ê di nav we de bêm pîroz kirin.
42 Û dema we bînim welatê ji
bapîrên we re sond dayîbûm ku ez
ê bidim wan, welatê Îsraêlê hûn
ê bizanibin ku, ez XUDAN im.
43 Û hûn ê li wir bîranîna rêyên
xwe û hemû karên xwe bikin; ew
karên ku, we xwe bi wan ve mindar
kirin û ji ber hemû xerabiyên ku
we kirine hûn ê ji xwe bikerihin.
44 Ya mala Îsraêlê, ne li gor rêyên
xwe yî xerab û karên xwe yî xerab,
lê belê dema di oxira navê xwe de
ez wusa bikim, hûn ê bizanibin
ku, ez XUDAN im, gotina Xudan,
XUDAN.

*Îkaza ji Başûr re*

45 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 46 Lawê mirov wecê xwe
berbi başûrê ve bizivirîne û berbi
başûrê ve bibêje û li hemberî da-
ristana beyarê başûrê[1] peyxamber-
tiyê bike 47 û ji daristana başûrê
re bibêje: Gotina XUDAN guh-
darî bike! Xudan, XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê di hundirê te de
agir pêbixim û dê di hundirê te de
her darê hêşîn û her darê hişk bi-
xwe û biqedîne; pêta ku pêkeve dê
venemire û ji başûr heta bakur dê
hemû wec bi wê biqemirin. 48 Û
hemû mirov dê bibînin ku, ez XU-
DAN, min wê pêxist; dê ew ê ve-
nemire. 49 Û gotim: Ax ya Xudan,
XUDAN! Bona min ew dibêjin:
Ma ne zilamekî ku methelokan
dibêje yî?

*Şûrê Xwedê yê Daraziyê*

21 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Ya lawê mi-
rov, wecê xwe berbi Orşelîmê
bizivirîne û li dijî cîhên pîroz
ve bibêje û li dijî welatê Îsraêlê
peyxambertiyê bike 3 û ji welatê
Îsraêlê re bibêje: XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez li dijî te me û ez
ê şûrê xwe ji kalanê wê derxînim
û ez ê ji te yê salih jî yê xerab jî
jêbikim û bavêjim! 4 Madem ku
ez ê ji te yê salih û yê xerab jê-
bikim û bavêjim, ji ber vê yekê
dê ji başûr heta bakur bona hemû
mirovan şûrê min ji kalanê xwe
ve derkeve 5 û dê hemû mirov
bizanibin ku, ez XUDAN, min
şûrê xwe ji kalanê wî ve derxist;
êdî dê venegere cîhê xwe. 6 Hun-
dirê xwe bikişîne, ya lawê mirov;
pişta xwe xwar bike û li ber çavên
wan bi jan û keser hundirê xwe
bikişîne! 7 Û dema ew ji te re: Ma
çima tu hundirê xwe dikişînî? bi-
bêjin, tuyê ji wan re bibêje: Ji ber
agahiyê, ji ber ku tê û dê her dil
buhule û dê hemû dest sist bibin
û dê her ruh ji bîr ve biçin û dê
hemû çong mîna avê lawaz bibin;
ji ber ku a vay tê, dê wusa bibe,

1 Bi Îbranîtî Negeb, aliyê başûrê Cihûdayê.

gotina Xudan, XUDAN.
8 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 9 Lawê mirov peyxamber-
tiyê bike û bibêje: Xudan wusa
dibêje: Bibêje ku: Şûr, şûr ew şûr
hate tûj kirin, him jî hate sîqal ki-
rin! 10 Bona ku serjê bike, bona
ku wekî birûskê lêxe hate sîqal
kirin; çawa em kêfxweş bibin?
Asaya[1] lawê min wekî din her
êzingî biçûk dibîne! 11 Û bona
ku di dest de bête girtin, ji bo
sîqal kirinê hate dayîn; şûr, ew
hate tûj kirin, belê, bona ku ji
destê yê ku dukuje bête dayîn
hate sîqal kirin! 12 Lawê mirov,
feryadê bike û biûre! Ji ber ku li
ser netewa min, li ser hemû begên
Îsraêlê ye; ew tevî netewa min ji
şûr re hatin dayîn; ji ber vê yekê
li kemaxa xwe bixe. 13 Ji ber ku
ceribandin heye û ger çoyê biçûk
dibîne jî êdî nemîne dê çi bibe?
Gotina Xudan, XUDAN. 14 Û
tu ya lawê mirov, peyxamberti-
yê bike û destên xwe biçerpîne û
şûr, şûrê yên ku bi birîna xedar
ve birîndar bûyîne bila du carî, sê
carî lê bixe; şûrê mezinê birîndarê
ku birîna wî xedar e, yê ku ke-
tiye odeya wan e! 15 Bona ku
dilên wan buhule û tilpekîbûnên
wan zêde bibe, şûrê ku dibiriqe
danîm hemberî deriyên wan; ax!
Wê kirin mîna birûskê, bona ku
serjê bike biriqandin. 16 Amade
be, berbi rastê bimeşe, were rêzê,
berbi çepê bimeşe, wecê te bi kî-
jan alî ve bête zivirandin, bi wî
alî ve bimeşe! 17 Ez ê jî destên
xwe biçerpînim û hêrsa xwe aş
bikim, ez, XUDAN, min gòt!

*Şûrê Qiralê Babîlê*

18 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 19 Û tu, lawê mirov, bona
ku şûrê qiralê Babîlê were ji xwe
re du rêyî çêbike; dê her du jî ji
welatekî derkevin û nîşanekê dey-
ne derekê; nîşanê deyne serê rêya
bajêr. 20 Bona ku şûr bi ser bajarê
Rabbayê ya ku lawên Ammon e û
di hundirê Orşelîmê ya ku bi dîwar
e de bi ser Cihûdayê ve were rê çê
bike! 21 Ji ber ku qiralê Babîlê li
cîhê ku rê cuda dibe, li serê du rê-
gehê bona ku remilê bavêje sekinî;
tîran tevî hev kirin, ji terafîm re
pirsî, li kezeba reş nihêrt! 22 Bona
ku dalîtê deynin, di şikestinê de
devê xwe vekin, bi dengê bilind
biqêrîn, dalîtê deynin hemberê
derî, meterîsan kom bikin û bircan
çêbikin, remila Orşelîmê di destê
wî yê rastê de bû. 23 Û dê di çavên
yên ku ji wan re sondan dayîne de
bibe mîna falekî vala; lê belê ew,
bona ku bên girtin fesadiyê di bîra
xwe de tîne.
24 Ji ber vê yekê Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Madem ku we
gunehên xwe eşkere kirine û di

[1] An jî: Şûr.

hemû karên xwe de bi nîşan kiri-
na sûcên xwe we fesadiyên xwe bi
bîr ve anîn; madem ku hûn bi bîr
ve hatin, hûn ê bi destê ve bike-
vin. 25 Û tu, begê Îsraêlê, zilamê
xerab û yê bi birîna xedar ê ku di
fesadiya dema dawîn de rojên wî
gîhaştine, 26 Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Şaşikê rake û tacê
derxîne; êdî dê ev wusa nebe. Yê
nizm bilind bike û yê bilind nizm
bike! 27 Ez ê ser û binî bikim, ser
û binî, ser û binî bikim û heq yê
kî be, heta ku ew were êdî dê ev jî
nemîne û ez ê bidim wî.
28 Û tu, ya lawê mirov, peyxam-
bertiyê bike û bibêje: Bona lawên
Ammon û ji ber gazincên ku ew
dikin, Xudan, XUDAN wusa
dibêje, tu jî bibêje: Şûr, şûr hatiye
kişandin, bona ku serjê bike, da-
qurtîne û wekî birûskê lêbixe hati-
ye sîqal kirin; 29 di wê navberê de,
ji te re xewn û xeyalê vala dibînin û
ji te re remila derewîn vedikin, da
ku, te bînin ser histuyên zilamên
xerab ên ku birînên wan xedar in;
ew zilamên xerab ên ku di dema
fesadiya dawiyê de rojên wan ha-
tine! 30 Wê bixe kalanê wê. Ez
ê li cîhê ku tu hatiye afirandin, li
warê ku tu hatiye dinê serweriyê li
te bikim. 31 Û ez ê xezeba xwe bi
ser te ve birijînim; ez ê agirê hêrsa
xwe bi ser te ve puf bikim û ez ê
te bidim destê zilamên hov, ewên
ku, di helaq kirinê de bi huner in.
32 Tuyê ji agir re bibe êm; dê di
nava welêt de xwîna te bête rijan-
din; êdî tuyê neyê bîranînê; ji ber
ku ez, XUDAN, min got.

*Gunehê Orşelîmê*

22 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Û ma tuyê
serweriyê bike, ya lawê mirov,
ma tuyê serweriyê li bajarê bi
xwîn bike? Wê çaxê hemû tiştên
wê yî mekrûh jê re bighîne. 3 Û
bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Bajarê bona ku wexta wê
were di hundirê xwe de xwînê di-
rijîne û bajarê ku bona xwe min-
dar bike, li dijî xwe pûtan çêdike!
4 Tu bi xwîna xwe yî te rijandiye
sucdar bû û bi pûtên ku te çêki-
rine tu mindar bû û te rojên xwe
nêzîk kirin û tu gîhaşt dawiya
salên xwe; ji ber vê yekê min te
di nav neteweyan de kir tiştekî
ku şermezariye û bona hemû ne-
teweyan te kirim tiştekî tinazê.
5 Yên ku nêzîkî te ne û yên ku
dûr in jî dê tinazên xwe bi te re
bikin, bajarê ku navê wê mindar û
şemateya wê zêde ye.
6 A vay, her yek bona heta ku ji
destên wan were xwînê birijînin,
begên Îsraêlê di hundirê te de
bûn. 7 Di te de dayik û bav bi nîn-
bûnê hesibandin; di hundirê te de
li dijî mêvan zordestiyê kirin, di
te de li sêwî û jinebiyê re neheqi-
yê kirin. 8 Te tiştên min yên pîroz

biçûk dît û Sebtên min xera kir.
9 Bona xwîn rijandinê zilamên îf-
tirayê dikin, di hundirê te de bûn
û yên ku li serê çiyayan dixwarin
di hundirê te de bûn; di te de bê
heyayiyê kirin. 10 Tazîbûna ba-
vên xwe di te de vekirin; dema
pîrek gemarî bû di te de êrîşî wê
kirin. 11 Hin kesan bi jina cîranê
xwe re karê mekrûh kir; hin kes jî
bi bê heyayiyê ve bûka xwe min-
dar kir; hin kesan di te de xwuşka
xwe, qîza bavê xwe nizm kir.
12 Di hundirê te de bona ku xwînê
birijînin bertîlê stendin; te selefê û
kara zêdeyiyê rahişt û te bi zor-
destiyê ji cîranên xwe ve qezenca
neheq stend û te min ji bîr kir, go-
tina Xudan, XUDAN.
13 Û a vay, ji ber qezenca
xerab ya te kiriye û ji ber xwîna ku
di te de ye, li kulma xwe xistim.
14 Di rojên ku ez ê bi te re dest bi
kar bikim de gelo dê dilê te deyax
bike, destên te dê bi quwet be? Ez,
XUDAN, min got û ez ê bikim.
15 Û ez ê te di nav neteweyan de
belav bikim û ez ê te di nav welatan
de biweşînim û ez ê mindariya te ji
ser te ve bibim. 16 Û li ber çavên
neteweyan tuyê bi xwe xera bibe û
tuyê bizanibe ku, ez XUDAN im.
17 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 18 Lawê mirov, bona min
mala Îsraêlê bû gûhesin; gişt di
hundirê derdaneyek hesin hulan-
dinê de tûnc û cela û hesin û gule
ne, gûhesinê zîvê ne. 19 Ji ber
vê yekê Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Madem ku hûn gişt bûn
gûhesin, ji ber vê yekê, a vay, ez ê
we di nav Orşelîmê de bicivînim.
20 Bona buhulînin çawa ji bo agir
bi ser wê ve puf bikin zîvê û tûnc
û hesin û gule û cela di derdaneyê
de bicivînin, ez ê jî bi hêrs û xeyda
xwe we wusa bicivînim û deynim
wir û ez ê we buhulînim. 21 Û ez
ê we bicivînim û agirê xezeba xwe
bi ser we ve puf bikim û hûn ê di
hundirê wê de buhulin. 22 Di hun-
dirê derdaneyê de zîv çawa bête
hulandin, hûn ê di hundirê wê de
wusa buhulin û hûn ê bizanibin
ku, ez, XUDAN, min hêrsa xwe
bi ser we ve rijand.
23 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 24 Lawê mirov, jê re bibêje:
Tu welatê ku nehatiye paqij kirin
û di roja xezebê de baran bi ser
ve nebarî ye. 25 Peyxamberên wê
mîna şêrê ku digurme û nêçîrê di-
perçiqîne, di hundirê wê de dek û
dolabê danîn; can daqurtandin; xe-
zîneyan û tiştên bi qîmet rahiştin;
di hundirê bajêr de jinên bî zêde
kirin. 26 Kahînên wan zorê dan
zagona min û tiştên min ê pîroz
xera kirin; di navbera tiştên pîroz
û tiştên bêrêz de cihêtî nekirin û
ya mindar û ya paqij ji mirovan
re negotin û çavên xwe ji Sebtên
min ve zivirandin û di nav wan de
ez biçûk hatim xistin. 27 Di hun-

dirê wê de serokên wê, bona ku
qezenca xerab bi dest ve bixin di
xwîn rijandinê de û di tune kirina
canan de mîna gurên ku nêçîran
perçe dikin in. 28 Û peyxamberên
wan bi xewn û xeyalên vala dîtinê
û bi remil avêtina derewîn ya ku
ji wan re dinêrin û çawa ku XU-
DAN negotiye, lê bi gotina: Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje, wan bi
heriyê ve sîwax kirin. 29 Netewa
welêt xedariyê kirin û şelandinê
kirin û yê zebûn û xizan êşandin û
bi neheqî xedariyê li mêvan kirin.
30 Û bona ku bila dîwêr ava bike
û li ber min di kendalê de bisekine
ku ez wî helaq nekim di nav wan
de li zilamekî geriyam; lê tu kesek
nedîtim. 31 Ji ber vê yekê xezeba
xwe bi ser wan ve rijandim; bi
agirê xezeba xwe wan qedandim;
rêyên wan anîm serê wan, gotina
Xudan, XUDAN.

*Çîroka mînakiya Ohola (Îsarêl) û Oholîba (Cihûda)*

23 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 2 Lawê mirov, qîzên
dayikekê, du pîrek hebûn 3 û li
Misirê fahşetiyê kirin; di ciwanti-
ya xwe de fahşetiyê kirin; pêsîrên
wan li wir hatin şidandin û li wir
dest li sînga qîzitiya wan ve hate
dayîn. 4 Û navên wan, ya mezin
Ohola[1] û ya xwuşka wê Oholîba[2]
bû û ew bûn yên min û law û qîzan
anîn dinê. Û dema em li navên
wan binêrin, Ohola Samîriye ye û
Oholîba Orşelîm e.
5 Û dema Ohola ya min bû
fahşetiyê kir û dil da leyistokên
xwe, Asûriyên cîran, 6 yên ku,
walî û begên lacîwerd li xwe ki-
rine, gişt egîdên ku dil dikişînin û
siwarên ku li hespan siwar bûne
bûn. 7 Û bi wan re fahşetiyê kir,
ew gişt ji lawên Asûrê zilamên
ku hatine hilbijartin bûn û ger dil
bijandibe kê, bi hemû pûtên wan
xwe mindar kir. 8 Û ji rojên Mi-
sirê ve fahşetiyên wan nehiştin, ji
ber ku di ciwantiya wê de pê re
raketin û destê xwe di sînga qîzi-
tiya wê de dan û fahşetiyên xwe
bi ser wê ve rijandin. 9 Ji ber vê
yekê min wê da destê leyistokên
wê yên ku dil bijandiye wan, dam
destê lawên Asûrê. 10 Wan ta-
zîbûna wê vekirin, law û qîzên wê
rahiştin û wê bi şûr kuştin û ew di
nav pîrekan de bû methelokek û li
ser wê daraziyan meşandin.
11 Û xwuşka wê Oholîba vêya dît
û di dil bijandinê de û di fahşetiyên
xwe yên ku ji fahşetiyên xwuşka
xwe zêdetir in de, ev ji ya din xe-
rabtir bû. 12 Dilê xwe bijand lawên
Asûrê, walî û began, siwarên ku bi
zehf rewnaqdarî li xwe kirine û li
hespan siwar bûyîne, egîdên ku

1 Çadira wê (wî).
2 Çadira min di wê de ye.

giştikên wan dil dikişînin. 13 Û
dîtim ku mindar e; rêya her duyan
jî yek bû. 14 Û fahşetiyên xwe zê-
detir kir; ji ber ku wê zilamên li ser
dîwêr hatine xêz kirin, 15 wêne-
yên ku şûtikê li pişta xwe girêdane
û di serên wan de şaşika mezin,
di xuyabûnê de gişt cengewarên
erebeyê, li welatê ku hatine dinê,
di welatê Kildaniyan de, li gor
mînakiya lawên Babîl, wêneyên
Kildaniyan ên ku bi rengesorê ve
hatine xêz kirin dîtin. 16 Û dema
dît, dilê xwe da wan[1] û şandiyan
ji welatê Kildaniyan re, ji wan re
şand. 17 Û lawên Babîlê hatin cem
wê, livînên bi hev re şabûnê[2] û bi
fahşetiyan wê mindar kirin û ji
wan re bû mindar û canê wê ji wan
kerihî. 18 Û fahşetiyên xwe vekir
û tazîbûna xwe vekir; canê min
ji xwuşka wê çawa kerihî be, wê
gavê canê min ji wê jî wusa kerihî.
19 Û di rojên ciwanbûna xwe de li
warê Misirê fahşetî kirina xwe di
bîra xwe de anî û fahşetiyên xwe
zêde kir. 20 Û dil da rêhevalên
xwe yên kêfdarî, ên ku goştên wan
mîna goştê kerê û piştên wan mîna
pişta bergîrê ne. 21 Tu bi vî awayî
dîsa vegeriya bêheyatiya ciwani-
ya xwe, wê çaxa ku, bona destê
xwe di sînga te de bidin, Misiriyan
pêsîrên ciwantiya te şidandibûn.
22 Ji ber vê yekê, ya Oholîba, Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje: A vay,
ez ê leyistokên te ên ku canê te ji
wan kerihiye, li dijî te rakim û ez ê
wan, 23 lawên Babîlê û hemû Kil-
daniyan, Pekod û Şoa û Koa û tevî
wan hemû lawên Asûrê, bo hem-
ber dorê li dijî te bînim; egîdên
ku dil dikişînin, gişt walî û began,
cengewarên erebeyan û zilamên bi
nav û deng, gişt yên ku li hespan
siwar dibin. 24 Û dê li dijî te bi
çekan, bi erebeyên cengê û bi ere-
beyan û wekî ajaweya neteweyan
bin, dê werin û bi mertala mezin
û bi mertala biçûk û bi kumzirxê
li hember dorê dê li dijî te rêz bi-
bin û ez ê daraziyê bidim wan û dê
li gor qanûnên xwe daraziyê li te
bikin. 25 Û ez ê çavnebartiya xwe
deynim hemberî te û dê bi xeyd li
te bikin; dê poz û guhên te jêbikin
û bixînin û yê ku ji ber te maye dê
bi şûr bikeve, dê law û qîzên te
rahêlin û dê agir yê ji ber te bimîne
bixwe û biqedîne. 26 Û dê kincê
te ji te bikin û xişirên te yî xweşik
rahêlin. 27 Û ez ê bêheyayiya te û
fahşetiya te ya ku ji warê Misirê
ye, di te de biqedînim û tuyê çavên
xwe ji wan re raneke û êdî tuyê Mi-
sirê di bîra xwe de nîne. 28 Ji ber
ku Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ez ê te bidim destên zilamên ku
tu ji wan kerihiye, destê zilamên
ku canê te ji wan kerihiye 29 û

1 Dilê xwe bijand wan.

2 Ji hev hezkirinê.

dê bi neyartî li te bikin û hilbera
keda te rahêlin û dê te tazî û vekirî
bihêlin û dê tazîbûna fahşetiyên te
û bêheyayiyên te jî fahşetiyên te jî
vebin.
30 Dê vana li te bikin, ji ber ku
te li pêy neteweyan fahşetiyê kir
û ji ber ku tu bi pûtên wan ve
mindar bû. 31 Tu di rêya xwuşka
xwe de meşiya; ji ber vê yekê ez
ê tasa wê bidim destê te. 32 Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje: Tuyê
ji tasa xwuşka xwe vexwe, ew
kûr û fireh e; dê bi te bikenin û dê
qerf û tinazên xwe bi te bikin; ew
tas pirr tiştan radihêle. 33 Tuyê
bi serxweşî û keserê ve tijî bibe;
tasa xwuşka te Samîriye, tasa şaşî
û têkçûnê ye. 34 Û tuyê wê ve-
xwe û tuyê wê dabelihîne û tuyê
perçeyên wê bikoje û tuyê sînga
xwe biçirîne; ji ber ku min got,
gotina Xudan, XUDAN. 35 Ji ber
vê yekê Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Madem ku te min ji bîr
kir û te min avêt paşî xwe, tu jî
bêheyayiyên xwe û fahşetiyên
xwe hilgire.
36 Û XUDAN ji min re got: Lawê
mirov, ma tuyê daraziyê li Ohola
û Oholîba ve bikî? Wê gavê tiştên
wanî mekrûh ji wan re bibêje. 37 Ji
ber ku zinê kirin û di destên wan de
xwîn heye û bi pûtên xwe re zinê
kirin û lawên xwe yên ku ji min
re anîne dinê jî bona bibin xwarin,
wan ji agir ve derbas kirin. 38 Û
vêya jî bi min kirin; di eynî rojê
de perestgeha min mindar kirin û
Sebtên min xera kirin. 39 Ji ber
paşî ku bona pûtên xwe lawên xwe
serjê kirin, di eynî rojê de bona pe-
restgeha min xera bikin ketin wê
derê û a vay, di nava xaniyê min de
wusa kirin. 40 Û we bona zilamên
ku dê ji dûr ve werin jî şandin, yên
ku ji wan re şandî hatine şandin jî,
a vay, hatin; te bona wan xwe şuşt
û kilê li çavên xwe kişand û te bi
xemlan xwe xemiland 41 û tu li ser
livînek rewneqdar rûnişt û li ber
wê sifra ku hatibû amadekirin hebû
û te buxura min û rûnê min danî
ser wê. 42 Û pê re şemateya ajawe-
yek bêxem hebû û tevî zilamên ji
rêzê ji çolê ve serxweş hatin anîn
û bazinan xistin destên wan her du
pîrekan û tacên xweşikiyê xistin
seriyên wan.
43 Û bona pîreka ku di nav zinê de
hinciriye gotim: Niha ew ê bi vê
pîrekê, ew ê jî bi wan re fahşetiyê
bike. 44 Û mîna ku dikevin cem
fahîşeyekê, ketin cem wê; bi wî
avayî ketin cem Ohola û Oholîba,
cem wan pîrekên bê heya. 45 Û
zilamên salih, li gor daraziya ku
ji pîrekên zinê dikin re ye û li gor
daraziya ku ji pîrekên ku xwînê
dirijînin re ye, dê darizînê li wan
bikin; ji ber ew pîrekên ku zinê
dikin e û di destên wan de xwîn
heye. 46 Ji ber ku Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Ez ê ajaweyek

bi ser wan ve derxînim û bona ku
bi vir û wir de bên avêtin û bên
tazî kirin ez ê wan bidim dest.
47 Û dê ew ajaweya wan bi kevi-
ran ve birecimînin û dê bi şûrên
xwe ve wan jêkin û bixînin; dê
law û qîzên wan bukujin û xani-
yên wan bişewitînin. 48 Û ez ê li
welêt dawiya bêheyayiyê bînim û
dê hemû jin fêr bibin û dê li gor
bêheyayiya we nekin. 49 Û dê
bêheyayiya we bixînin seriyên we
û hûn ê ji ber pûtên xwe, sûcên
xwe hilgirin û hûn ê bizanibin ku,
ez Xudan, XUDAN im.

*Mînakiya Sîtila Zingarî*

24 Û di sala nehemîn de, di
meha dehan de, di roja
dehemîn ya mehê de, vê gotina
XUDAN ji min re hat: 2 Ya lawê
mirov, ji xwe re navê vê rojê, tam
navê vê rojê binivîse! Qiralê Babîlê
tam vê rojê nêzîkî Babîlê bû. 3 Û
ji wê mala asê re methelokek bi-
bêje û ji wan re bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Sîtilê, sîtilê
deyne û avê tijî hundirê wê bike;
4 perçeyên ku dê lê bête xistinî
wê, her perçeyê qenc, hêtê û par-
xanê di hundirê wê de bide hev;
bi hestiyên bijartî wê dagire!
5 Bona herî bijartiyên keriyê û
hestiyên ku li bin sîtilê ne, barek
êzing rahêle; wê baş bikelîne ku
bila hestiyên wê di hundirê wê de
bikelin!
6 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Wey li serê sîtila
wî bajarê bi xwîn! Ew sîtila ku
zingara wê di hundirê wê de ye
û zingara wê jê derneketiye; ji
wê perçe bi perçe derxînin; bona
wê pişk nehat avêtin. 7 Ji ber ku
xwînê di navê bajêr de; bona ku
wê bi axê buxumîne nerijand, lê
danî ser zinara tazî. 8 Ji bo, bona
tolê hilde hêrsa wê sor bike xwî-
na wê danîm ser zinara tazî ku,
bila neyê nuxumandin. 9 Ji ber
vê yekê Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Wey li serê bajarê bi
xwîn! Ez ê jî loda êzingê mezin
bikim. 10 Êzingan lod bike, agir
bi pêt bike, goşt qenc bikelîne,
ava goşt rohn bike, bila hestî jî
bişewitin! 11 Û li ser kozirên wê
sîtilê bi valahî dayne ku bila sor
bibe û paxirê wê bişewite û di
hundirê wê de pîsitiya wê buhu-
le û zingara wê here. 12 Bi kedê
xwe westand; lê belê zingara wê
ya qalind jê dernakeve; zingara
wê bi agir ve dernakeve! 13 Di
mindariya te de bêheyayî heye;
madem ku te paqij kirim û tu
paqij nebû, heta ku li dijî te hêrsa
xwe aş bikim êdî tuyê ji minda-
riya xwe neyê paqij kirin. 14 Ez,
XUDAN, min got, dê bibe û ez
ê wê bikim; ez ê lê neborînim û
neparêzim û ez ê poşman nebim;
dê li gor rê û karên te darizînê li
te bikin, gotina Xudan, XUDAN.

*Mirina Pîreka Hêzekîêl*

15 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 16 Lawê mirov, a vay, ez ê yê
ku evîna çavên te ye bi lêxistinekê
ji destê te bistînim; lê belê tuyê li
xwe nexe û negirî û dê hêstirên te
nerijin. 17 Ji dil û kezebê binale,
tuyê bona miriyan şînê nekişîne;
şaşika xwe li serê xwe bipêçe û
çaroxên xwe li lingên xwe bike,
lêvên xwe nexumîne û nanê gel
nexwe.
18 Û sibehê ji netewê re gotim;
êvarî jî jina min mir û sibeha paşîn
mîna ku ji min re emir hatiye dayîn
kirim. 19 Û netewe ji min re gotin:
Gelo tiştên ku tu dikî bona me çi
ne, ma tuyê vêya ji me re nebêje?
20 Û ji wan re gotim: Vê gotina
XUDAN ji min re hat: 21 Ji mala
Îsraêlê re bibêje; Xudan, XUDAN
wusa dibêje: A vay, tiştê ku quwe-
ta we pê pesna xwe dida, yê ku ji
çavên we re evîn e û yê ku canê
we li ser dilerize, perestgeha xwe
ez ê xera bikim û law û qîzên we,
ên ku we li pêy hiştine dê bi şûr
bikevin. 22 Û min çi kiribe, hûn ê
jî wusa bikin; hûn ê lêvên xwe ne-
xumînin û hûn ê nanê gel nexwin.
23 Û dê şaşikên we di serê we
de û çaroxên we di lingên we de
bin; hûn ê li xwe nexin û negirîn;
lê hûn ê di nav fesadiyên xwe de
buhulin û herin û hûn ê serî bi serî
bidin hev û bigirîn. 24 Û dê Hê-
zekîêl ji we re bibe elametek, wî
her çi çêkiribe, hûn ê jî wusa bikin
û dema bibe hûn ê bizanibin ku ez
Xudan, XUDAN im.
25 Û tu, lawê mirov, roja ku
ez quwetên wan, kêfxweşiya
xweşikiyên wan, ya ku ji çavên
wan re evîn e û yê ku canên wan
bêriya wê dike, law û qîzên wan
ji wan bistînim, 26 di wê rojê de,
qey dê nebe ku revokek were û
vêya bi te re bide bihîstin? 27 Dê
wê rojê devê te ji revok re vebe
û tuyê bibêje û êdî tuyê bêziman
nemîne û tuyê ji wan re bibe ela-
metek û dê bizanibin ku, ez XU-
DAN im.

*Ammon tête şermezarkirin*

Hêz 21,33-37; Yêr 49,1-6; Amos 1,13-15

25 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 2 Lawê mirov, wecê
xwe berbi lawên Ammon ve bizi-
virîne û li hemberî wan peyxam-
bertiyê bike 3 û ji lawên Ammon
re bibêje: Gotina Xudan, XUDAN
guhdarî bikin! Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Madem ku te, dema
perestgeha min xera kirin, li dijî
wê û dema warê Îsraêlê wêran ki-
rin, li dijî wê û dema mala Cihû-
dayê çûn sirgûnê, li dijî wê: Ha,
ha! got; 4 ji ber vê yekê, a vay, ez
ê te bi milkî bidim lawên rojhilatê
û dê zomên xwe di te de daynin û
dê qonaxên xwe di te de daynin û
dê ew ê mêwên te bixwin û şîrê te
vexwin. 5 Û ez ê Rabbayê bona

keriyan çêregeh û welatê lawên
Ammon bona keriyan bikim cîhê
mexelê û hûn ê bizanibin ku, ez
XUDAN im. 6 Ji ber ku Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Madem ku
te destê xwe çirpandin û te xwe
hilkutand û li dijî warê Îsraêlê
bi hemûya heqareta dilê xwe tu
kêfxweş bû; 7 ji ber vê yekê, a
vay, min destê xwe li dijî te dirêj
kir û ez ê te wekî malê talanê bi-
dim neteweyan û ez ê te ji nav ne-
teweyan jêkim û bavêjim û ez ê te
ji welatan rakim û bavêjim; ez ê te
helaq bikim û tuyê bizanibe ku ez
XUDAN im.

*Moab têtе şermezarkirin*

Tsêf 2,8-11

8 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Madem ku Moab û Seîr: A vay,
mala Cihûdayê mîna hemû gelan e,
dibêjin; 9 ji ber vê, a vay, ez ê ji ba-
jarên ku xemla welat in, ji bajarên ku
li sînorên wê ne, ji Beyt-Yeşîmotê,
Baal-Meonê û ji Kîryataîmê,
10 li dijî lawên Ammon, ji lawên
rojhilatê re sînga Moabê vekim û
bona ku di nav neteweyan de lawên
Ammon di bîr de neyên, ez ê wan bi
milkî bidim 11 û ez ê li ser Moabê
daraziyan bimeşînim û dê bizanibin
ku, ez XUDAN im.

*Edom têtе şermezarkirin*

Yêr 49,7-22; Hêz 35; Oba 1; Îşa 34

12 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Madem ku Edom bi tolhildanê
xwe li dijî mala Cihûdayê radaye
û gelleki sûcan kir û ji wan ve tolê
hilda; 13 ji ber vê yekê Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Ez ê destê
xwe li dijî Edomê dirêj bikim, ez
ê mirov jî heywan jî ji wir jêkim û
bavêjim û ji Temanê wêdetir ez ê
wê xerab bikim û heta Dedanê dê
bi şûr ve bikevin! 14 Û ez ê tola
xwe bi destê netewa xwe Îsraêlê
bînim ser Edomê û dê li Edomê li
gor hêrsa min û xeyda min bikin
û dê ew ê tola min fêhm bikin, go-
tina Xudan, XUDAN.

*Filistî têne şermezarkirin*

Yêr 7,4; Tsêf 2,4-7; Zek 9,5-7

15 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Madem ku Filistiyan bi girr û
kînê xwe radan û bona bi kerihiya
abadîn helaq bikin bi heqaretê ji
canê tol hildan. 16 Ji ber vê yekê
Xudan, XUDAN wusa dibêje: A
vay, ez ê li dijî Filistiyan destê xwe
dirêj bikim û Keretiyan jêbikim û
bavêjim û ji ber mayiyên yên ku li
qeraxa behrê ne, tune bikim. 17 Û
bi pekandinên bi xeyd ez ê ji wan
tolên mezin hildim û dema ez tola
xwe bînim ser wan, dê bizanibin
ku, ez XUDAN im!

*Bajarê Sûrê têtе şermezarkirin*

26 Û di sala yanzdehan de, di
roja yekemîn ya mehê de
wusa bû ku, vê gotina XUDAN

ji min re hat: 2 Lawê mirov, ma-
dem ku li dijî Orşelîmê Sûr: Ha,
ha! Bajarê ku deriyê neteweyan e
şikest; her tiştê wê zivirî aliyê min,
ji ber ku ew xera bû, ez ê tijî bi-
bim! got. 3 Ji ber vê yekê Xudan,
XUDAN wusa dibêje: A vay, ez li
dijî te me ya Sûr! Û behr şepêlên
xwe çawa derxîne, ez ê jî li dijî te
zehf neteweyan wusa derxînim!
4 Û dê dîwarên Sûrê xera bikin û
qûleyên wê xera bikin û ez ê ji ser
wê axa wê bixeritînim û wê bikim
zinarekî tazî. 5 Dê di nav behrê de
bibe cîhekî tor avêtinê; ji ber ku
min got, gotina Xudan, XUDAN
û dê ji neteweyan re bibe malê
talanê. 6 Û dê qîzên wê yên ku li
beyarê ne bi şûr ve bukujin û dê
bizanibin ku ez XUDAN im.
7 Ji ber ku Xudan, XUDAN wusa
dibêje: A vay, ez ê Nebûkadnet-
sarê qiralê Babîlê, qiralê qiralan
ji bakur bi hespan û bi erebeyên
cengê û bi siwaran û bi ajawe-
yekê û bi gelekî zêde ve bînim ser
Sûrê. 8 Dê li beyarê qîzên te bi şûr
ve bukuje û dê li dijî te bircan ava
bike û li dijî te meterîsê deyne û
dê li dijî te mertala mezin rake.
9 Û dê li dijî dîwarên te dalîtên
xwe deyne û bi bivirên xwe dê
qûleyên te xera bike. 10 Ji ber
zêdeyiya hespên wî dê tozên wan
te buxumîne; çawa bikevin ba-
jarê ku di dîwarê wê de qul hatiye
vekirin, dema bi vî awayî bikeve
deriyên te jî, ji ber şemateya si-
waran û tekeran û erebeyên cengê
dê dîwarên te bilerizin. 11 Dê bi
simên hespên xwe hemû kuçeyên
te bicûn; dê netewa te bi şûr ve
bukujin û dê sitûnên quweta te gêr
bibin[1]. 12 Û dê malê te talan bikin
û malê bazirgan tartale bikin û dê
dîwarên te xera bikin û xaniyên te
yî xweşik têk bibin û kevirên te
û oniyên te û axa te bavêjin nava
avan. 13 Û ez ê dawiya dengê
sitranên te bînim û dê êdî dengê
çenkên te neyê bihîstin. 14 Û ez
ê te bikim zinarekî tazî; tuyê bibe
cîhê ku tor lê tên raxistin; carekî
din tuyê neyê ava kirin; ji ber ku
ez, XUDAN, min got, gotina Xu-
dan, XUDAN
15 Xudan, XUDAN ji Sûrê
re wusa dibêje: Gava di te de
şikestin bibe, dema birîndar bina-
lin, ma dê ji gurmîniya xera bûna
te girave nelerizin? 16 Û dê hemû
begên behrê ji textên xwe dake-
vin û dê qeftanên xwe derxînin û
dê xwe ji kincê xwe yî reng rengî
hatine neqişandin tazî bikin û dê
xwe bi toqînê buxumînin, dê li
erdê rûnin û her tim bilerizin û bi
te şaş û metal bimînin. 17 Û dê
li ser te lawijan bixwînin û ji te
re bibêjin: Bajarê ku deryavan lê
rûdinin, bajarê bi nav û deng yê
ku li behrê xwurt e, tu çawa tune

1 Gêrê erdê, an jî: Bi erdê ve gêr bibin.

bû, tu û yên ku di te de rûdinin,
hûn ku, we toqînê li ser hemûyên
ku di hundirê we de rûdinin ve
berdabûn! 18 Niha, di roja te yî
xerabûnê de, dê girave bilerizin;
belê, giraveyên ku di behrê de ne,
dê ji ber çûyîna te şaş bibin!
19 Ji ber ku Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Dema te mîna ba-
jarên ku tu kesê tê de rûdinê ne-
maye kirim bajarekî xerabûyî,
dema balûpêlê derxistim ser te
û avên mezin jî te bunuxumînin,
20 te bi yên ku li kortalê rûdinin
re daxînim cem neteweya dema
kevnar û bona ku yê di te de rûnê
tune be, ez ê te bi yên ku dadike-
vin kortalê re, li kûrahiyên erdê,
li cîhên ku ji demên kevnar ve
xerabûyî ne bidim rûniştandin û
ez ê mezintiyê bidim warê jîndar-
an. 21 Ez ê te bikim toqînek û êdî
tuyê tune bibe; tuyê bête gerîn û
êdî tuyê abadîn neye dîtin, gotina
Xudan, XUDAN.

### *Lawija ku bona Bajarê Sûrê hatiye gotin*

İşa 23,1-9

27 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Û tu, lawê
mirov, bona Sûrê lawijê bixwîne
3 û ji Sûrê re bibêje: Ya tu, yê ku
li deriyê behran rûdinê, bajarê ku
li dijî pirr giraveyan, bi netewe-
yan re danûstendinê dike; Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Ya Sûr, te
got: Ez di xweşikiyê de bêqisûr
im! 4 Sînorên te di sînga behran
de ye; avakirên te, xweşikiya te
derxistin serî. 5 Hemû textikên te
ji serwiyên Senîrê çêkirin; bona
ku ji te re sitûn çêbikin ji Lubnanê
darekî erzê rahiştin. 6 Bêrên te ji
çiloyê Başanê çêkirin; textikên te
yî rûniştinê ji diranê fîlê ê ku bi
şimşîrê giraveyên Kîttîmê ve ha-
tiye kutandin çêkirin. 7 Bona ku
xêliya te ji te re bibe ala, ji kitana
zirav ya Misirê ya ku bi reng rengî
hatiye nexşandin bû; lacîwerd û
erxewaniya giraveyên Elîşayê ji
te re bûn sîwan. 8 Yên ku li Say-
dayê û Arwadê rûdinin bêrvanên
te ne; ya Sûr, di te de zilamên bi
zanyarî hebûn; rêberên te ew bûn.
9 Yên ku gedûkên keştiyên te di-
selihandin[1], kalepîrên Gebalê û
zilamên bi hîkmet bûn; bona ku
bi malên te re buguherin hemû
keştiyên behrê, tevî deryavanan
di te de bûn. 10 Faris û Lûd û
Pût di artêşa te de, zilamên te yî
cengê bûn; di hundirê te de mertal
û kumzirxê daliqandin; wan sem-
yanê dan te. 11 Lawên Arwadê
û artêşa te bi hember dorê li ser
dîwaran bûn û di qûleyên te de zi-
lamên bi metirsî hebûn; mertalên
xwe bi dor û ber li dîwarên te da-

[1] Yanê yên ku qîr û qetranê di textên keştiyan didin.

liqandin, xweşikiya te derxistin
serî.
12 Ji ber zêdeyiya her tewr û
celebê malan Tarşîş bazirganê te
bû; zîv, hesin, cela û guleyê didan
bazarên te. 13 Yavan, Tûbal û
Meşek bazirganên te bûn; malên te
bi canên mirovan û bi feraxên tûnc
re duguhertin. 14 Yên ku ji mala
Togarmayê ne hespan, hespên
cengê û qantiran didan bazarên
te. 15 Lawên Dedan bazirganên te
bûn; danûstendina gellek girave-
yan di destê te de bûn; wekî berdê-
lê diranfîl û ebenûsê ji te re dianîn.
16 Ji ber zêdeyiya karên destên te
Sûrî bazirganê te bû; zimrûdan, bi
neqşiyên erxewanî û reng rengî û
kitana tenik û mircan û yaqûdan
didan bazarên te. 17 Warê Cihûda
û Îsraêl, ew bazirganên te bûn;
wekî berdêla malên te genimê
Mînnitê û pîdeyan û hungiv û
merhemê didan. 18 Ji ber zêdeyiya
karên destê te, ji ber zêdeyiya bi
her tewrî malên te Şam bi xemra
Helbonê û bi peşma sipî bazirganê
te bû. 19 Vedan û Yavan ben
didan bazarên te; di nav malên te
de hesinê ku hatiye çînîn, darçîn û
qamirê bêhnxweş hebûn. 20 Bona
ku li hespan siwar bibe di qumaşên
bi qîmet de Dedan bazirganê te
bû. 21 Alê Ereban û hemû begên
Kedarê bazirganên destê te bûn; bi
berxikan û beranan û nêriyan vana
bazirganên te bûn. 22 Bazirganên
Şeba û Raamayê, ew bazirganên te
bûn; bi seretayî giştikên biharatan
û kevirên bi qîmet ên bi her tewrî
û zêr didan bazarên te. 23 Haran û
Kanne û Eden, bazirganên Şebayê,
Asûr û Kîlmad bazirganên te bûn.
24 Malên te bi malên bijartî, bi
topên qumaşên lacîwerd û reng
rengî, bi sindoqên kincan yên bi
qîmet ên ku ji darê erzê hatine
çêkirin û bi benan ve dor lê hatine
girtin duguhertin. 25 Bona malên
te karwan keştiyên Tarşîşê bûn û
te dagirtin û tu di sînga behrê de
zehf bi mezintî bû.
26 Bêrvanên te, te gîhandin avên
mezin; di sînga behran de bayê
rojhilatê te şikand. 27 Di roja
têkçûna te de, dewlemendiya te
û bazarên te, malê te yî bazirga-
niyê, deryavanên te û rêberên te,
hosteyên te yî keştiyê û yên ku
bi malê te re danûstendinê dikin
û hemû zilamên cengê yên ku di
te de ne û hemû ajawe ya ku di
hundirê te de ye, dê bikevin sînga
behran. 28 Dê ji qêrînên rêberên te
berav bihejin. 29 Û hemû bêrvan,
deryavan, hemû rêberên behrê
dê ji keştiyên xwe dakevin; dê li
reşahiyê bisekinin 30 û dê bona te
dengên xwe bilind bikin û qêrîna
bi jan bikin û dê axê bavêjin serê
xwe; di xweliyê de xwe bigevi-
zînin 31 û dê bona te porên xwe
biliçikînin û dê xwe bi pertalê ve
buxumînin û dê bi êşa dil bi tah-

liyê li xwe bixin û ji te re bigirîn.
32 Û dê di şînên xwe de lawijê ji
te re bixwînin û dê bona te fîxanê
bikin û bibêjin: Mîna Sûrê, mîna
bajarê ku di nava behrê de dengê
wê hatiye birrîn, kîjan bajar heye?
33 Her ku malê bazara te ji behran
derdiket, te pirr neteweyan têr kir;
bi dewlemendî û zêdeyiya malên
xwe te qiralên dinê dewlemend
kir. 34 Dema di avên balûpal de ji
behran ve tu hate şikandin, danû-
stendina te û hemû ajaweya te di
nava te de ket. 35 Hemûyên ku li
giraveyan rûdiniştin li te şaş man
û mûyên qiralên wan hilperiyan;
wecên wan zer bûn. 36 Di nav ne-
teweyan de bazirgan li te difîkin;
tu bû toqînek û heta abadînê tuyê
tune bibe.

### *Qiralê Sûrê têtê şermezarkirin*

Îşa 23,8-9; 14,11-15; 2,12-22

28 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov
ji serwerê Sûrê re bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Madem ku
dilê te bilind bû û te: Ez îlah im,
di sînga behran de, di texta Xwe-
dê de rûdinim got û çawa ku tu ne
Xwedê ye lê mirovek e, lê dîsa
jî te dilê xwe kir mîna dilê Xwe-
dê; – 3 a vay, tu hîn jî ji Danîêl
zanyartir î; qet razekî[1] nikarin ji te
veşêrin; 4 te bi zanyariya xwe û bi
fêhmkariya xwe ji xwe re serwetê
çêkir û di xezîneyên xwe de zêr û
zîv da hev; 5 te bi zanyariya xwe
yî mezin û bi danûstendina xwe
serweta xwe zêde kir û bi serwe-
ta te dilê te bilind bû; – 6 ji ber
vê yekê Xudan, XUDAN[1] wusa
dibêje: Madem ku te dilê xwe kir
mîna dilê Xwedê, 7 ji ber vê yekê,
a vay, ez ê biyanan, tirsehêzên ne-
teweyan bînim ser te û dê li dijî
xweşikiya zanyariya te şûrên xwe
bikişînin û dê biriqandina te min-
dar bikin. 8 Dê te daxînin kortalê
û tuyê di sînga behran de, bi mi-
rina yên ku hatine kuştin, bimire.
9 Gelo tuyê li dijî yê ku te kuştiye
jî bikaribe: Ez Xwedê me, bibêje?
Û di destê yê ku te birîndar kiri-
ye de tu ne Xwedê, lê mirovek e.
10 Tuyê bi destê biyanan, bi miri-
na bêsunetan bimire; ji ber ku min
got, gotina Xudan, XUDAN.
11 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 12 Lawê mirov, bona qiralê
Sûrê lawijê bixwîne û jê re bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje: Yê
ku mohra gehîştî, bi zanyariyê ve
tijî û di xweşikiyê de bêkêmasî
ye, tu bû. 13 Tu li Adenê di bexçê
Xwedê de bû û dorûberên te bi ya-
qûda zer, heqîqa sor û heqîqa sipî,
zimrûdê ezmanî, heqîq, yeşîm,
yaqûtê şîn, yaqûtê gewez kevirên
zimrûdê û bi hemû kevirên biqîmet
û bi zêr ve hatibûn girtin; karên tef
û zirneyên te ji te bûn; roja ku tu ha-

[1] Sir.

tibû afirandin hatibûn amade kirin.
14 Tu Kerûbiyek parêzker, yê ku
hatiye mesh kirin bû û min te çi-
kand, tu li ser çiyayê pîroz yê Xwe-
dê bû; tu di nava kevirên ji agir in
de geriya. 15 Heta ku di te de xerabî
hate dîtin ji roja ku tu hatiye afiran-
din tu di rêyên xwe de bêqisûr bû.
16 Ji ber zêdebûna danûstendina te
hundirê te bi zordestiyê ve dagirtin
û te sûc kir û mîna tiştê mindar,
te ji çiyayê Xwedê avêtim û te,
Kerûbiyê ku siyê belav dike, ji nav
kevirên ku ji agir in avêtim û tune
kirim. 17 Dilê te ji ber xweşikiya
xwe bilind bû; ji ber rewnaqiya
xwe, te zanyariya xwe xera kir; te
li erdê xistim; bona ku bibînin te
avêtim li ber çavên qiralan. 18 Te
perestgehên xwe bi zêdeyiya fesa-
diyên xwe, bi xerabiya danûsten-
dina xwe ve xera kir û ji hundirê
te agir derxistim; wê te xwar û qe-
dand û li ber çavên hemûyên ku te
dîtine te li rûyê erdê ve kirim xolav.
19 Di nav neteweyan de hemûyên
ku te nas dikin dê bi te şaş û metal
bimînin, tu bû toqînek û tuyê heta
abadînê tune bibe!

*Bajarê Saydayê tête şermezarkirin*

Yêr 25,22

20 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 21 Lawê mirov, wecê xwe ber-
bi Saydayê bizivirîne û li dijî wê
peyxambertiyê bike 22 û bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
A vay, ya Sayda, ez li dijî te me
û ez ê di hundirê te de mezintiyê
bibînim û dema di hundirê te de
daraziyan bimeşînim dê bizanibin
ku, ez XUDAN im û ez ê di hun-
dirê wê de bêm pîroz kirin. 23 Û
ez ê webayê bişînim hundirê wê
û xwînê bişînim kuçeyên wê û bi
şûrê ku li hember dorê bi ser wê ve
tên dê birîndar bikevin û dê biza-
nibin ku, ez XUDAN im. 24 Û ji
yên ku li dora mala Îsraêlê ne û wê
biçûk dibînin, êdî dê tu qirşê ku bi
wan re rabe û tu kelemê ku biêşîne
nemîne û dê bizanibin ku ez Xu-
dan, XUDAN im.
25 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Dema ku min mala Îsraêlê ji ne-
teweyên ku di nav wan de belav
bûne da hev û li ber çavên nete-
weyan di hundirê wan de hatim
pîroz kirin, dê di axên xwe yên ku
dayîme qûlê xwe Aqûp de rûnin.
26 Û dê bi ewlekariyê li wir rûnin
û wexta ku li ser hemûyên ku li
hember dorê wan biçûk dixînin
daraziyê bimeşînim, dê xaniyan
ava bikin û rezan biçikînin[1] û di
ewlekariyê de rûnin û dê bizanibin
ku ez Xwedayê wan XUDAN im.

*Misir tête şermezarkirin*

Hêz 30-32

29 Di sala dehemîn de, di
meha dehemîn de, di roja

*1* Daynin.

donzdehan ya mehê de, vê gotina
XUDAN ji min re hat: 2 Lawê mi-
rov, wecê xwe bizivirîne hemberî
qiralê Misirê Fîrawûn û li dijî wî
û li dijî hemûya Misirê peyxam-
bertiyê bike; 3 biaxife û bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Fîrawûnê qiralê Misirê, yê ku
di nav çemên xwe de radikeve û
cenawirê mezin yê ku: Çemê min
yê min e û wê bona xwe çêkirim
dibêje, a vay, ez li dijî te me! 4 Û
ez ê çanqilan li çenga te bixim û
ez ê masiyên çemên te jî bi pe-
likên te ve bizeliqînim û ez ê te
tevî hemû masiyên çemên te yên
ku bi pelikên te ve zeliqîne ji nav
çemên te derxînim. 5 Û ez ê te, te
jî û hemû masiyên çemên te jî ba-
vêjim çolê; tuyê bikeve rûyê beya-
rê; tuyê neyê civandin û hevdan;
min te wekî êm da cenawirên erdê
û civîkên ezmanê! 6 Û yên ku li
Misirê rûdinin ji ber ku ji mala Îs-
raêlê re bûne çoyek ji qamirê, dê
gişt pê bizanibin ku, ez XUDAN
im. 7 Dema te bi dest girt tu şikest
û te hemû sermilên wan qelişand
û dema xwe bi ser te ve ebandin,
tu şikest û te hemû navkêlên wan
kir lerizok.
8 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê şûr bi ser
te ve bînim û ez ê mirov jî, hey-
wan jî ji te jêbikim û bavêjim. 9 Û
dê warê Misirê bibe wêranxane û
çol û dê bizanibin ku, ez XUDAN
im. Madem ku wî: Çem yê min e
û min wê çêkir, got; 10 a vay, ji
ber vê yekê ez li dijî te me û li dijî
çemên te me û ez ê warê Misirê ji
qûleya Sevenê heta sînorê welatê
Hebeşê, bitûmî bitûmî bikim çol
û wêran. 11 Dê ji hundirê wê ve
lingê mirov derbas nebe û dê çel
sal di hundirê wê de zilam rû-
nenê. 12 Ez ê di nav welatên ku
wêran bûne de welatê Misirê jî
wêran bikim; di nav bajarên ku
wêran bûyîne de dê bajarên wê jî
çel sal wêran bimînin û ez ê Mi-
siriyan di nav neteweyan de belav
bikim û ez ê wan li nav welatan
biweşînim.
13 Ji ber ku Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Paşî çel salan ez ê
Misiriyan ji neteweyên ku di nav
wan de hatine belav kirin bidim
hev 14 û ez ê sirgûnên Misirê
şunda bînim û ez ê wan vegerînim
welatê Patrosê, welatê ku lê bûyî-
ne û dê li wir bibin qiraletiyek
xîret şikestî. 15 Dê ji nav qirale-
tiyan bibe qiraletiya ku herî xîreta
wê hatiye şikestî ye û dê êdî li ser
neteweyan bilind nebe û êdî bona
ku ji neteweyan re nebin serwer
ez ê wan kêm bikim. 16 Û êdî
ew, wekî fesadiya ku lawên Îsraêl
her ku dizivirin û lê dinêrin dikin,
tiştekî ku pê ewle bibe dê tune be
û dê bizanibin ku, ez Xudan, XU-
DAN im.
17 Û di sala bîst û heftan de, di

meha yekemîn de, di roja yekem
ya mehê de wusa bû ku, vê gotina
XUDAN ji min re hat: 18 Lawê
mirov, Nebûkadnetsarê qiralê
Babîlê, li hemberî Sûrê bi artêşa
xwe ve zehf xizmetê da kirin;
porê her seriyî weşiya û çermê
her milî qeşirîn[1] û ji ber xizmeta
ku li hemberî wê kiriye ji wî re jî,
ji artêşa wî re jî ji Sûrê ve tu mîşe
nebû. 19 Ji ber vê yekê Xudan,
XUDAN wusa dibêje: A vay, ez ê
welatê Misirê bidim Nebûkadnet-
sarê qiralê Babîlê û dê gelê xwe
bibe û dê malê talanê rahêle û dê
wê talan bike û dê mîşeya artêşa
wî ev be. 20 Di berdêla xizmeta
ku kiriye de, min welatê Misirê
da wî, ji ber ku bona min xebitîn,
gotina Xudan, XUDAN.
21 Wê rojê ez ê qiloçekî ji mala
Îsraêlê re bidim ajdan û di nav
wan de ji te re dev bidim vekirin û
dê bizanibin ku ez XUDAN im.

*Dê XUDAN Misirê biceza bike*

30 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov,
peyxambertiyê bike û bibêje: Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje: Bi go-
tina: Ax ew roj! biûrin. 3 Ji ber ku
ew roj nêz e, belê, roja XUDAN
nêz e; roja ewran, wexta nete-
weyan e. 4 Û dê şûr bi ser Misirê
ve were û dema yên ku li Misirê
hatine lêxistin bikevin erdê, dê li
welatê Hebeşê jan hebe û dê aja-
weya wê rahêlin û bibin û dê bin-
gehên wê xera bibin. 5 Bi wan re
dê welatê Hebeşê û Pût û Lûd û
hemû neteweya tevlihev û Kûb û
lawên warê peymanê dê bi şûr ve
bikevin.
6 XUDAN wusa dibêje: Yên ku
bûne alîkarê Misirê jî dê bên kuştin
û dê xirûra hêza wê bikeve! Dê ji
Mîgdolê heta Asvanê bi şûr ve
bikevin[2]! Gotina Xudan, XUDAN.
7 Û dê di nav welatên ku wêran
bûyîne de dê bibin wêraneyek û
bajarên wê dê di nav bajarên ku
wêran bûyîne de bibin. 8 Û dema
agir bi Misirê bixim, gava hemû
alîkarên wê jî bişkên, dê bizani-
bin ku, ez XUDAN im. 9 Bona li
Hebeşên ku bêxem in tirsê bifirîne,
wê rojê dê ji ber min bi keştiyan
şandî derkevin û mîna di roja Mi-
sirê de bûye, dê di wan de jî jan
bibe; ji ber ku, a vay, tê!
10 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ez ê bi destê Nebûkadnetsarê qi-
ralê Babîlê dawiya gelê Misirê
jî bînim. 11 Ew û pê re netewa
wî, tirsehêzên neteweyan bona
ku welêt wêran bikin dê bifiri-
sin hundir û dê li dijî Misirê şûrê
xwe bikişînin û dê bi yên ku ha-

1 Hatin qeşartin, hatin gurandin.
2 An jî: Dê di hundirê wê de ji qûleya Sevenê wêdetir bi şûr ve bikevin!

tine kuştin ve Misirê dagirin.
12 Û ez ê çeman ziwa bikim û
welêt bifroşim zilamên xerab
û ez ê bi destê biyanan welêt û
hemûyên ku di hundirê wê de ne
wêran bikim; ez, XUDAN, min
got.
13 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ez ê pûtan jî tune bikim û seneman
ji Memfîsê rahêjim û bavêjim û êdî
dê li welatê Misirê tu kes nebe beg
û ez ê tirsê bidim welatê Misirê.
14 Û ez ê Patrosê wêran bikim û
agir bi Tsoanê ve bixim û li bajarên
Noyê daraziyan bajom. 15 Û ez ê
li ser Sîna birca Misirê hêrsa xwe
birijînim û ez ê gelê Noyê jêbikim
û bavêjim. 16 Û ez ê agir bi Misirê
ve bixim; dê Sîn gellekî jan bide û
dîwarên bajarên Noyê biqeleşin û
bi rojê dê di hundirê Memfîsê de
neyar hebin[1]! 17 Dê xortên Aven û
Pî-Besetê bi şûr ve bikevin û ew ê
herin sirgûnê. 18 Û dema li Tehaf-
nesê nîrên Misirê şikandim, dê li
wir roj tarî bibe û dê xirûra quweta
wê li wir bişkê; dema em werin wê,
dê ewrek wê buxumîne û dê qîzên
wê herin sirgûnê. 19 Bi vî awayî
ez ê li Misirê daraziyan bajom û dê
bizanibin ku, ez XUDAN im.
20 Û di sala yanzdehan de, di
meha yekem de, di roja heftemîn
ya mehê de wusa bû ku, vê gotina
XUDAN ji min re hat: 21 Lawê
mirov, bazûya Fîrawûnê qiralê
Misirê şikandim û a vay, bila
dermanên ku çêbûnê didin bên
dayîn, bona girêdanê bila pêçikê
lê bipêçin ku, ji bo bikaribe bi şûr
bigire bazûya wî xwurt bibe, wê
nepêçiyan. 22 Ji ber vê yekê Xu-
dan, XUDAN wusa dibêje: A vay,
ez li dijî Fîrawûnê qiralê Misirê
me û ez ê bazûyên wî, yê ku xwurt
e jî û yê ku hatiye şikestandin jî ez
ê bişkînim û ez ê şûr ji destê wî ve
bixînim. 23 Û ez ê Misiriyan di
nav neteweyan de belav bikim û
wan li nav welatan ve bireşînim.
24 Û ez ê bazûyên qiralê Babîlê
xwurt bikim û şûrê xwe bidim
destê wî; ez ê bazûyên Fîrawûn
jî bişkînim û zilamekî birîna wî
xedar e çawa binale, dê li ber wî
wusa binale. 25 Û ez ê bazûyên
qiralê Babîlê xwurttir bikim; dê
bazûyên Fîrawûn jî bikevin û
dema şûrê xwe bidim destê qiralê
Babîlê û dema wî li ser welatê
Misirê re dirêj bikim, dê bizani-
bin ku, ez XUDAN im. 26 Û ez
ê Misiriyan di nav neteweyan de
belav bikim û wan li nav welatan
ve bireşînim û dê bizanibin ku, ez
XUDAN im.

*Wekoka darê Erzê*

31 Û di sala yanzdehan de,
di meha sêwem de, di roja
yekem ya mehê de wusa bû ku,
vê gotina XUDAN ji min re hat:

[1] Bên dîtin.

2 Lawê mirov, ji Fîrawûnê qiralê
Misirê û ji ajaweya wî re bêje:
Ma tu bi mezintiya xwe ve wekî
kê ye? 3 A vay, Asûr, li Lubnanê
darê erzê[1], guliyên wê xweşik,
sîha wê mîna sîha daristanê û
qama wê bilind bû û girê wê di
nav ewran de bû. 4 Avan wê xwe-
dî kirin, balûpal wê mezin kir,
çemên wê li dora cîhê ku hatibû
çikandin diherikîn û erxên xwe
gîhand hemû darên beyarê. 5 Bo
vê yekê qama wê ji hemû darên
beyarê zêdetir dirêj bû û dema ji
ber ava zêde gulî berda milên wê
zêde bûn û guliyên wê dirêj bûn.
6 Hemû civîkên ezmanan di guli-
yên wê de hêlînê çêkirin û hemû
heywanên beyarê di bin milên wê
de zayînê kirin û hemû neteweyên
mezin di sîha wê de rûniştin. 7 Û
bi mezintiya xwe, bi dirêjiya guli-
yên xwe xweşik bû; ji ber ku reha
wê li cem pirr avan bû. 8 Darên
erzê yên ku di bexça Xwedê de
bûn, nikaribûn wê binixumandi-
na; darên qajê ne mîna milên wê
bûn û darên çinarê ne mîna guli-
yên wê bûn, di xweşikiya xwe de
tu darên ku di bexça Xwedê de
bûn ne mîna wê bûn. 9 Min wê
bi dirêjiya guliyên wê, xweşik kir
û hemû darên Adenê yên ku di
bexça Xwedê de bûn çavnebariyê
li wê kirin.
10 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Madem ku qama wê
dirêj bû û girê xwe gîhand nav
ewran û bi bilindahiya wê dilê
wê bilind bû; 11 ez ê jî wê bidim
destê xwurtê neteweyan û çi hew-
ce bike, helbet dê bi wê bike; wê
ji ber xerabiya wê qewirandim.
12 Û biyanan, tirsehêzê netewe-
yan wê jêkirin û avêtin û wê ber-
dan; guliyên wê ketin ser çiyayan
û nava hemû çeman û di hemû ne-
walên warê de milên wê şikestin
û hemû neteweyên dinê ji sîha wê
vekişiyan û daketin û wê berdan.
13 Dê hemû civîkên ezmanan da-
kevin ser gewda wê ya têk çûyî û
dê hemû cenawirên beyarê li ser
guliyên wê bin, 14 da ku, hemû
darên li cem ava ne li gor qama
xwe bilind nebin û girên xwe ne-
gihînin nav ewran û hemûyên ku
avê vedixwin, ji wan yên xwurt
bi bilindahiya xwe çik nesekinin;
ji ber ku hemûyên wan, di nav
mirovan de bi yên ku dê dakevin
kortalê ji kûrahiyên erdê re, ji mi-
rinê re hatin dayîn.
15 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Roja ku daket warê miriyan, şînê
dam girtin; bo wê ser balûpalê nu-
xumandim û çemên wê rahiştim û
ber avên mezin hatin birîn û bona
wê bi Lubnanê re şînê dam girtin
û bona wê hemû darên beyarê bûr-
çûyî bûn. 16 Dema bi yên ku da-
dikevin kortalê wê daxistim warê

1 Wurz.

miriyan, ji gurmîniya têkçûna wê neteweyan hejandim û hemû darên Adenê, darên herî bijartî û herî xweşik yên Lubnanê, hemûyên ku avê vedixwin, di kûrahiyên erdê de xemrevîniyê dîtin. 17 Vana jî, belê, yên ku bazûyê wê bûn, di nav neteweyan de yên ku di siya wê de rûdinin, bi wî re daketin warê miriyan, cem yên ku bi şûr ve hatine kuştin.

18 Tu bi vî awayî di mezintî û bilindahiyê de ji nav darên Adenê mîna kîjanê ye? Lê belê tuyê tevî darê Adenê bête daxistinî herî kûrahiyên erdê; tevî yên ku bi şûr ve hatine kuştin, tuyê di nav bêsunetan de rakeve. Fîrawûn û hemû ajaweya wî ev e, gotina Xudan, XUDAN.

*Lawija ku bona Fîrawûn hatiye gotin*

32 Û di sala donzdehan de, di meha donzdehan de, di roja yekem ya mehê de wusa bû ku, vê gotina XUDAN ji min re hat: 2 Lawê mirov, bona Fîrawûnê qiralê Misirê lawijê bixwîne û jê re bêje: Te xwe kir mîna şêrê ciwan yê neteweyan, lê belê tu di behran de mîna cenawir e û te êrîşî nav çemên wan kir û te bi lingê xwe avan tev da û te çemên wan şêlo kir. 3 Xudan, XUDAN wusa dibêje: Ez ê tevî ajaweyên gellek neteweyan tora xwe li ser te bireşînim û dê te bi tora min ve derxînin derve. 4 Û ez ê te li reşahiyê berdim, ez ê te bavêjim rûyê erdê û ez ê hemû civîkên ezmanan li ser te daxînim û ez ê hemû heywanên erdê bi te têr bikim. 5 Û ez ê goştê te li ser çiyayan raxim û ez ê çeman bi laşê te ve dagirim. 6 Warê ku te tê de avjeniyê dikir, heta çiyayan ez ê bi xwîna te ve avdan bikim û dê newal bi te ve tijî.bibin. 7 Û dema te bitefînim, ez ê ezmanan binixumînim û ez ê sitêrkên wê tarî bikim, rojê bi ewran ve binixumînim û dê heyv ronahiya xwe nede. 8 Û ez ê li ser te hemû tîrêjên ezmanan yên ku dibiriqin tarî bikim û ez ê tariyê bînim ser warê te, gotina Xudan, XUDAN. 9 Û dema agahiya şikestandina te bigihînim welatan û nav neteweyên ku tu wan nas nake, ez ê dilê gellek neteweyan bikesirînim. 10 Û ji ber te ez ê gellek neteweyan şaş bikim û dema li ber wan şûrê xwe kil bikim, dê ji ber te pûrtê qiralên wan hilperin û di roja têkçûna te de dê gişt bona canên xwe her dem bilerizin.

11 Ji ber ku Xudan, XUDAN wusa dibêje: Dê şûrê qiralê Babîlê bi ser te ve were. 12 Ez ê ajaweya te bi şûrê egîdan ve bixînim; gişt tirsehêzên neteweyan in û dê xirûra Misirê bişikînin û dê hemû ajaweya wê helaq bibe. 13 Û ez ê hemû heywanên wê ji cem pirr avan tune bikim û êdî

dê lingê mirov wan tevlihev neke
û dê lingê heywan wan tevlihev
neke. 14 Wê gavê ez ê avên wan
zelal bikim û çemên wan mîna
rûn biherikînim, gotina Xudan,
XUDAN. 15 Dema welatê Misirê
wêran û xera kirim û welat ji yên
ku di hundir de ne hate vala kirin,
dema ez bi şûr ve li hemûyên ku
li wir rûdinin bixim, dê bizanibin
ku ez XUDAN im. 16 Lawij ev e,
dê vêya bixwînin; dê qîzên nete-
weyan vê lawijê bixwînin; dê vê
lawijê li ser Misirê, li ser hemû
ajaweya wê vê lawijê bixwînin,
gotina Xudan, XUDAN.

*Dê Fîrawûn û hemû gelê wî bi şûr ve bêne kuştin*

Îşa 14,4-20; Wai 9,10

17 Û di sala donzdehan de, di roja
panzdehan ya mehê de wusa bû
ku, vê gotina XUDAN ji min re
hat: 18 Ya lawê mirov, bona gelê
Misirê fixanê bike û tevî yên ku
dadikevin kortalê wê û qîzên ne-
teweyên bi nav û deng, wan daxî-
ne kûrahiyên erdê. 19 Ma tu ji kî
xweşiktir î? Dakeve jêr û bi bêsu-
netan re rakeve! 20 Dê di nav yên
ku bi şûr ve ketine de bikevin; ew,
ji şûrê re hatiye dayîn; wê û hemû
ajaweya wê bikaşkaşînin! 21 Jîr û
dijwarên di nav egîdan de ne, dê
ji hundirê warê miriyan ve, ji wê
û alîkarên wê re bibêjin; daketin
jêr, yên bêsunet, yên ku bi şûr ve
hatine kuştin radikevin!
22 Asûr û hemû ajaweya wê li wir
e; gorên wê li dora wê; gişt hatine
kuştin, bi şûr ve ketine; 23 gorên
wan li dawiyên kortalê ve hatine
danîn û ajaweya wê li dora gora
wê; gişt hatine kuştin, bi şûr ve
ketine, ew yên ku di warê zindi-
yan de toqînê weşandin.
24 Elam û hemû ajaweya wê li
wir e, li dora gora wê; gişt hatine
kuştin, bi şûr ve ketine, ew yên
ku, bêyî sunetê daketin kûrahiyên
erdê, ew yên ku, li warê zindiyan
toqîna xwe weşandin û tevî yên
ku dadikevin kortalê şerma xwe li
xwe bar kirin. 25 Di nav yên ku
hatine kuştin de ji wê û ji hemû
ajaweya wê re nivînekê çêkirin û
gorên wan li dora wê; gişt bêsu-
net, bi şûr ve hatine kuştin; ji ber
ku li warê zindiyan toqîna wan
belav bûbû û tevî yên ku dadi-
kevin kortalê şermezariya xwe li
xwe bar kirin; wê danîn navbera
yên ku hatine kuştin.
26 Meşek, Tûbal û hemû civakên
wan li wir in, li dora gora wan; gişt
bêsunet, bi şûr ve hatine kuştin; ji
ber ku li warê zindiyan toqîna xwe
weşandin. 27 Û ew ê tevî egîdên ji
bêsunetan ve ketine ranekevin, ew
egîdên ku, tevî çekên xwe yî cengê
daketin warê miriyan û şûrên xwe
danîn bin seriyên xwe û fesadiyên
wan li ser hestiyên wan in; ji ber
ku ew li warê zindiyan toqîna egî-

dan bûn. 28 Lê belê tuyê di nav
bêsunetan de bişikê û tevî yên ku
bi şûr ve hatine kuştin rakeve.
29 Edom, qiralên wê û hemû begên
wê li wir in; ew xwurt bûn, lê belê
dîsa jî tevî yên ku bi şûr ve hatine
kuştin hatin raxistin; dê bi bêsune-
tan û bi yên ku daketine kortalê ve
rakevin. 30 Hemû begên Şîmalê û
hemû Saydayî li wir, ewên ku, tevî
yên ku hatine kuştin daketin; çawa
ku bi hêza xwe toqînê diweşandin,
lê dîsa jî şerm kirin û tevî yên ku
bêsunet in û bi şûr ve hatine kuştin
radikevin, tevî yên ku dadikevin
kortalê şermezariyên xwe li xwe
bar kirin.
31 Dê Fîrawûn wan bibîne û
Fîrawûnê ku bi şûr ve hatiye
kuştin û hemû artêşa wî, bona
hemû ajaweya xwe dê ew xem-
revîniyê bibîne! Gotina Xudan,
XUDAN. 32 Ji ber ku min toqîna
wî di hundirê warê zindiyan de
reşand; dê Fîrawûn û hemû gelê
wî tevî yên ku bi şûr ve hatine
kuştin di nav bêsunetan de bên
raxistin, gotina Xudan, XUDAN.

*Xwedê, Hêzekîêl mîna notirvanekî wezîfedar dike*
Hêz 3,17-21; K.Şa 20,28

33 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov
ji lawên netewa xwe re biaxife û
ji wan re bibêje: Dema şûr bi ser
welatekî ve bînim û netewa welêt
kesekî ji nav xwe ve rahêjin û wî
bona xwe wekî bi notirvanî dey-
nin; 3 dema bibînin ku şûr bi ser
welêt ve bê û ger notirvan li bori-
yê bixe û bona ku netewê hişyar
bike 4 û ger wê çaxê her kî dengê
boriyê bibihîze û xwe neparêze û
şûr were û wî rahêje, dê xwîna wî
li ser seriyê wî be. 5 Dengê bori-
yê bihîstiye û xwe neparastiye; dê
xwîna wî li ser wî be; lê belê ger
parastiba dê canê xwe azad biki-
ra. 6 Û ger notirvan bibîne ku şûr
tê û ger li boriyê nexe û ger ne-
tewe nehatibe parastin û şûr were
û ger ji wan canekî bistîne; ew ê
di fesadiya xwe de bête stendin;
lê belê ez ê di destê notirvan de li
xwîna wî bigerim.
7 Û tu, lawê mirov, min te ji mala
Îsraêlê re bi notirvanî danî û tuyê
gotinê ji devê min ve bibihîze û
tuyê ji aliyê min ve wan hişyar
bike. 8 Dema ez ji zilamê xerab
re: Ya zilamê xerab, tuyê mu-
heqeq bimire! bibêjim û tu bona
ku ji rêya xwe ve xwe biparêze ji
zilamê xerab re nebêje, ew zilamê
xerab dê di fesadiya xwe de bimi-
re, lê belê ez ê ji destê te li xwîna
wî bigerim. 9 Û ger bona ku ji
rêya xwe vegere tu zilamê xerab
jê biparêzîne û ger ji rêya xwe ve-
negere ew zilam di fesadiya xwe
de dimire, lê belê dê wusa bibe ku
tuyê canê xwe azad bike.
10 Û tu, lawê mirov, ji mala Îs-

raêlê re bibêje: Hûn wusa dibêjin:
Gunehên me û sûcên me li ser me
ne û em di wan de duhulin û ma
em ê çawa bijîn? 11 Ji wan re bi-
bêje: Bona mafê hebûna min, go-
tina Xudan, XUDAN, ez ne ji mi-
rina yê xerab, lê ji vegerîna zilamê
xerab ku ji rêya xwe vegere û bijî
zewqê digirim; vegerin, ji rêyên
xwe yî xerab vegerin! Ji ber ku,
ma hûn ê çima bimirin, ya mala
Îsraêlê? 12 Û tu, ya lawê mirov, ji
lawên netewa xwe re bibêje: Roja
ku yê salih guneh bike, baweriya
yê salih wî azad nake û roja ku
zilamê xerab ji xerabiya xwe ve-
gere, ji ber wê nakeve û yê salih
dema sûcê bike, ji ber baweriya
xwe zindî namîne[1]. 13 Bona yê
salih: Dê muheqeq bijî, bibêjim
û ger bi baweriya xwe ewledariyê
bike û bi ser ve xerabiyê bike, qet
yên ji karên wî yên salih jî di bîr
de nayê û di xerabiya ku kiriye de,
di wê de dimire. 14 Û dema ji zi-
lamê xerab re: Tuyê muheqeq bi-
mire bibêjim û ji sûcê xwe vegere
û ya heq û rast bike; 15 ger zilamê
xerab mişkaneyê şunda bide û ya
ku bi şelandinê rahiştiye bide, xe-
rabiyê neke û di zagona jiyanê de
bimeşe, dê muheqeq bijî, nemire.
16 Qet sûcekî ku kirine dê li dijî
wî neyên bîranîn; ya rast û heq ki-
riye; helbet ku dê bijî!
17 Lê belê lawên netewa te
dibêjin: Rêya Xudan ne rast e; lê
belê rêya wan ne rast e. 18 Dema
zilamê salih ji baweriya xwe ve-
gere û xerabiyê bike, dê di wê de
bimire. 19 Û dema zilamê xerab
ji xerabiya xwe vegere û ya heq û
rast e bike, dê bi wan re bijî. 20 Lê
belê hûn: Rêya Xudan ne rast e,
dibêjin. Ez ê ji we re, ji her kesî re
li gor rêyên wan daraziyê bikim,
ya mala Îsraêlê!

*Ketina Orşelîmê tête daxuyanî kirin*

21 Û di donzdeh saliya sirgûna
me de, di meha dehan de, di roja
pêncemîn ya mehê de wusa bû
ku, zilamekî ku ji Orşelîmê revi-
yaye û xelas bûyiye hat û ji min
re got: Bajar hate lêxistin. 22 Û
berî ku ew revoka were cem min,
êvarî destê XUDAN li ser min bû
û heta ku zilam sibehê were cem
min XUDAN devê min vekir û
devê min vebû û êdî ez ne bêzi-
man bûm.
23 Û vê gotina XUDAN ji min
re hat: 24 Lawê mirov, yên ku li
warê Îsraêlê, li wan cîhê xerabe
rûdinin, bi gotina: Çawa ku Bi-
rahîm zilamekî tenê bû, lê warê
bi mêrasî stend, lê belê em zêde
ne; welat bi mêrasî ji me re hatiye
dayîn, dibêjin. 25 Ji ber vê yekê ji
wan re bibêje: Xudan, XUDAN

*1* Baweriya wî nikare jiyanê bide wî, an jî: Baweriya wî, wî xelas nake.

wusa dibêje: Hûn goşt bi xwî-
na wê re dixwin û çavên xwe li
pûtan re radikin û hûn xwînê di-
rijînin û ma hûn ê welêt ji xwe re
bikin milk? 26 Hûn xwe disipêrin
şûrên xwe; karên mekrûh dikin
û her kes jina cîranê xwe mindar
dike û ma hûn ê welêt ji xwe re
bikin milk? 27 Tuyê ji wan re
wusa bibêje: Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Bona mafê hebûna
min, bi rastî, yên ku li cîhê xera
bûyîne rûdinin dê bi şûr ve bike-
vin û ez ê yê ku li wecê beyarê ye,
bona ku bixwin bidim cenawiran
û yên ku li bircan û di şikeftan de
ne, dê bi webayê bimirin. 28 Û ez
ê welêt bikim wêranxane û tiştekî
ku şaş dike û dê xirûra quweta wê
biqede û dê çiyayên Îsraêlê tena
bimînin û dê tu kes ji wan der-
bas nebe. 29 Û dema ji ber hemû
tiştên mekrûh ên ku kirine welat
bikim wêran û tiştekî ku şaş dike,
dê bizanibin ku, ez XUDAN im.
30 Û tu, ya lawê mirov, lawên ne-
tewa te di bin dîwaran de û di de-
riyên xaniyan de bona te axaftinê
dikin û ji hev re, her kes ji birayê
xwe re: De em herin û ka gotina
ku ji aliyê XUDAN ve derketiye
çi ye em bibihîzin, dibêjin. 31 Û
netewe çawa werin wusa tên û li
ber te, mîna netewa min rûdinin
û gotinên te guhdarî dikin, lê belê
wan nakin; ji ber ku bi devê xwe
zehf daxwazkar xuyanî dibin; lê
belê dilê wan li pêy qezenca wanî
xerab diçe. 32 Û a vay, tu bona
wan, bona yê bi qencî sazê lêdi-
xe û bona yê ku dengê wî xweş
e, mîna strana zehf şîrîn e; ji ber
ku gotina te guhdarî dikin, lê belê
wan nakin. 33 Lê belê dema ev
bibe ku – a vay, dibe! – wê gavê
dê ew bizanibin ku di nav wan de
peyxamberek hebû.

*Peyxambertiya li dijî şivanên Îsraêlê*
Yêr 23,1-3; K.Şa 20,28

34 Û vê gotina Xudan ji min
re hat: 2 Lawê mirov, li dijî
şivanên Îsraêlê peyxambertiyê bike
û ji wan re, ji wan şivanan re bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje: Wey
li serê şivanên Îsraêlê, yên ku xwe
bi xwe dajon! Ma yên ku şivan wan
bajon ne mîh in? 3 Hûn rûn dixwin
û hirî li xwe dikin, qelewan serjê
dikin û mîhan najon. 4 We lawazan
nezeximandin û yê nexweş baş ne-
kirin, ya şikestî nepêçiyan û ya ku
hatiye ajotin we şunda neanîn û we
li ya ku winda bûyiye negeriyan;
lê hûn bi quwetê û bi tundî ji wan
re bûn serwer. 5 Û ji ber ku şivan
nîne belav bûn û ji hemû cenawirên
beyarê re bûn xwarin û belav bûn.
6 Li hemû çiyayan û li ser her girê
bilind mîhên min eware geriyan û
mîhên min li hemûya rûyê erdê ve
belav bûn, yê ku dipirse jî nîne, yê
ku digere jî nîne.
7 Ji ber vê yekê, ya şivanno, go-

tina Xudan guhdarî bikin! 8 Bona mafê hebûna min, gotina Xudan, XUDAN, bi rastî, madem ku ji ber şivan nîne mîhên min hatin talan kirin û mîhên min ji hemû cenawirên beyarê re bûn xwarin û şivanên min li mîhên min negeriyan û şivanan mîhên min neajotin jî, lê tenê xwe bi xwe ajotin; 9 ji ber vê yekê, ya şivanno, gotina Xudan guhdarî bikin! 10 Xudan, XUDAN wusa dibêje: A vay, ez li dijî şivana me û ez ê ji destên wan li mîhên xwe bigerim û ez ê dawiya karên wanî ajotina mîhên xwe bînim û êdî dê şivanan ajotina xwe bi xwe nekin û ez ê mîhên xwe ji devên wan xelas bikim û dê ji wan re nebin xwarin.

*Şivanê Qenc*

Yêr 23,3-8

11 Ji ber ku Xudan, XUDAN wusa dibêje: A vay, ez, ez ê mîhên xwe bipirsim û lêkolînê li wan bikim. 12 Roja ku di nav mîhên xwe yî belavbûyî de be, şivan çawa lêkolînê li keriyê xwe bike, ez ê jî bi wî awayî lêkolînê li mîhên xwe bikim û ji heçî cîhên ku di roja bi ewr û tarî de belav bûyîne, ez ê wan xelas bikim. 13 Û ez ê wan ji neteweyan derxînim û ez ê wan ji welatan ve bidim hev û ez ê wan bînim axên wan û ez ê li ser çiyayên Îsraêlê, li newalan û di hemû cîhên rûniştinê ên welêt de wan bajom. 14 Ez ê wan di çêregeha qenc de bajom û dê zozana wan li ser çiyayên bilind yên Îsraêlê be; dê li wir, di çêregeha qenc de rakevin[1] û dê li ser çiyayên Îsraêlê di çêregeha qenc[2] de biçêrin. 15 Ez ê mîhên xwe biçêrînim û ez ê wan mexel bînim, gotina Xudan, XUDAN. 16 Ez ê li yê ku winda bûye bigerim û yê ku hatiye ajotin şunda bînim û ez ê yê şikestî bipêçim û yê ku nexweş e xwurt bikim, lê belê ez ê yê qelew û xwurt helaq bikim; ez ê bi dadî wan bajom.

17 Û hûn, ya keriyê min, Xudan, XUDAN wusa dibêje: A vay, yê ku bi mîha re di nav mîhan de, daraziyê ji beranan re jî, ji nêriyan re jî dike ez im. 18 Ma qey di çêregeha qenc de çêrîn ji we re hindik tê ku hûn ya ku ji ber çêregeha xwe maye bi lingên xwe ve dicûn? Û ma qey vexwarina avên zelal ji we re hindik tê ku yê ji ber maye hûn bi lingên xwe ve şolî dikin? 19 Û lê mîhên min jî yên ku bi lingên we ve hatine cûtin dixwin û ya ku bi lingên we ve hatiye şolî kirin vedixwin.

20 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN ji wan re wusa dibêje: A vay, ez, ez ê di nav mîha qelew

---

*1* Mexel bên.

*2* Birûn, an jî: Qelew.

û mîha lawaz de darazdinê bikim.
21 Madem ku hûn bi sîngê lê di-
xin û bi sermilê lê dixin û heta
ku hemû lawazan bi derve belav
bikin hûn bi qiloçên xwe tehn di-
din; 22 ji ber vê yekê ez ê keriyê
xwe xelas bikim û êdî dê nebin
malê talanê û ez ê di nav mîh û
mîhê de darizdanê bikim. 23 Û ez
ê tenê şivanekî deynim ser wan û
ez ê qûlê xwe Dawid, yê ku wan
bajo deynim; dê ew ê wan bajo û
ew ê bibe şivanê wan. 24 Û ez,
XUDAN, ez ê bibim Xwedayê
wan û dê di nav wan de qûlê min
Dawid bibe beg; ez XUDAN, min
got.
25 Û ez ê bi wan re peymana
xweşiyê daynim û li welêt dawi-
ya heywanên xerab bînim û dê li
çolê di ewlekariyê de rûnin û dê
di daristanan de rakevin. 26 Û ez
ê wan û cîhên li dora girê çiyayên
min e, bi berdar bikim û ez ê ba-
ranê di wextê wê de bibarînim;
dê bibin baranên berdariyê. 27 Û
dê darê beyarê mêwa xwe bide
û erd berê xwe bide û dê li ser
axên xwe di ewlekariyê de bin û
dema qeydên nîrên wan şikandim
û wan ji destê yên ku wan kirine
dîl azad kirim, dê bizanibin ku, ez
XUDAN im. 28 Û êdî dê ji nete-
weyan re nebin malê talanê û dê
cenawirên erdê wan nexwin û dê
di ewlekariyê de rûnin û tu kesê
ku wan bitirsîne dê tune be. 29 Û
bona ku bibe nav û deng ez ê ji
wan re tirhekî derxînim û êdî dê li
welêt bi xelayê neqelihin û êdî dê
heqaretên neteweyan nekişînin.
30 Û dê bizanibin ku, ez Xwe-
dayê wan XUDAN, bi wan re me
û ew, mala Îsraêl, neteweya min
e, gotina Xudan, XUDAN. 31 Û
hûn, mîhên min, hûn mirov in û
ez Xwedayê we me, gotina Xu-
dan, XUDAN.

*Edom tête şermezarkirin*

35 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov
berê wecê xwe bizivirîne çiyayê
Seîrê û li dijî wê peyxambertiyê
bike 3 û jê re bibêje: Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: A vay, ez li dijî
te me, ya çiyayê Seîrê û ez ê des-
tê xwe li dijî te dirêj bikim û ez
ê te bikim wêran û tiştekî ku şaş
dike. 4 Ez ê bajarên te xera bikim
û tuyê wêran bibe û tuyê bizanibe
ku, ez XUDAN im. 5 Madem ku
te nifrînek[1] abadîn xwedî kir û di
dema bêtariyan de, di dema dawi-
ya fesadiyê de, te lawên Îsraêl dan
destê şûr; 6 ji ber vê yekê, bona
mafê hebûna min, gotina Xudan,
XUDAN, ez ê te ji xwînê re ama-
de bikim û dê xwîn bera te bide;
madem ku tu ji xwînê nekerihî,
dê xwîn bera te bide. 7 Û ez ê çi-
yayê Seîrê bikim tiştekî şaş dike

[1] Nefretek.

û wêraneyek û ez ê reha yê ku
diçe wir û tê jêbikim. 8 Û ez ê bi
kuştiyên wê ve çiyayên wê dagi-
rim û di girên te de û di çemên te
de û di hemû newalên te de, yên
ku bi şûr ve hatine lêxistin li wan
deran bikevin. 9 Ez ê te bikim
wêraneyek abadîn û dê di bajarên
te de zilam rûnenê û hûn ê bizani-
bin ku ez XUDAN im!
10 Madem ku te got: Ev her du gel
û her du welat dê bibin yên min û
em ê wan ji xwe re bikin milk! Ya
rastî XUDAN li wir bû. 11 Ji ber
vê yekê; bona mafê hebûna min,
gotina Xudan, XUDAN, ji ber ke-
rihandina te yî li dijî wan e, ez ê li
gor çavnebarî û hêrsa ku te nîşanî
wan dayiye, ez ê bikim û dema da-
raziyê li te bikim, di nav wan de ez
ê xwe bidim nas kirinê[1]. 12 Û tuyê
bizanibe ku hemû kufrên te, yên ku
te li dijî çiyayên Îsraêlê bi gotina:
Bûn wêrane, bona ku em daqurtînin
ji me re hatin dayîn! kirine, ez XU-
DAN, min bihîst! 13 Û we bi devên
xwe, xwe li dijî min mezin kirin û
we gotinên xwe li dijî min zêde ki-
rin, min bihîst! 14 Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Dema hemûya dinê
di kêfxweşiyê de be, ez ê te wêran
bikim! 15 Ji bona ku wêran bûbû
tu çawa li ser mêrasa mala Îsraêlê
kêfxweş bûbe, ez ê jî ji te re wusa
bikim; tu, ya çiyayê Seîrê, tuyê
wêran bibe, hemûya Edomê jî gişt!
Û dê bizanibin ku, ez XUDAN im!

*Xwedê Bereketê li Îsraêlê dibarîne*

Yêr 31,4-14; 23-28

36 Û tu, lawê mirov, ji çiyayên
Îsraêlê re peyxambertiyê
bike û bibêje: Ya çiyayên Îsraêlê,
gotina XUDAN guhdarî bikin!
2 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Madem ku neyar li dijî we: Ha!
Û: Cîhên bilind yên demên ke-
vin bi milkî yên me ne! gotin,
3 ji ber vê yekê peyxambertiyê
bike û bibêje: Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Madem ku, madem
ku we wêran kirin û bona ku hûn
ji maweyên neteweyan re bibin
milk, ji her alî ve we daqurtandin
û hûn ketin zimên û hûn bûn kur-
tûpista netewê; 4 ji ber vê yekê,
ya çiyayên Îsraêlê, gotina Xudan,
XUDAN guhdarî bikin! Xudan,
XUDAN ji çiyayan re û ji gi-
ran re û ji gelî û newalan re û ji
wêranan û ji bajarên ku ji mawe-
yên neteweyên li dorê ne re bûne
malê talanê û tiştekî qerfokî re
wusa dibêje; 5 belê, ji ber vê yekê
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Rastî, li dijî maweyê neteweyan
û li dijî hemûya Edomê bi agirê
çavnebartiya xwe gotim, ew yên
ku, bona bi hemû kêfxweşiya dil,
bi heqareta ji dil û can welatê min
wekî malê talanê be bibezinê, ji
xwe re kirin milk! 6 Ji ber vê yekê

1 An jî: Xwe ji wan re bidim nas kirinê.

bona warê Îsraêlê peyxambertiyê
bike û ji çiyayan re û ji giran re
û ji çeman re bibêje; Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: A vay, min di
xeyda xwe de û di çavnebartiya
xwe de got, ji ber ku we heqare-
ta ku neteweyan kirine li xwe bar
kirin; 7 ji ber vê yekê Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Min destê xwe
bilind kir[1]: Bi rastî, neteweyên ku
li dora we ne, dê heqareta ku kiri-
ne ew bi xwe hilgirin! gotim.
8 Û hûn, ya çiyayên Îsraêlê, hûn ê
guliyên xwe aj bidin û mêwa xwe
bidin netewa min Îsraêlê; ji ber ku
dê di nêzîk de werin. 9 Ji ber ku a
vay, ez ji aliyê we me û ez ê berê
xwe bidim we û hûn ê werin bikar
anîn û hûn ê werin çandin 10 û ez
ê mirovan di ser we de, hemûya
mala Îsraêlê, giştikî zêde bikim
û dê li bajaran were rûniştin û dê
cîhên ku xera bûyîne bên ava ki-
rin 11 û ez ê mirov û heywan li ser
we zêde bikim û dê zêde bibin û
dê bi hilber bin û mîna rewşa we
yî kevin ez ê di we de zilaman bi-
dim rûniştandin û ez ê ji we re ji
destpêkê hîn jî qenctir bikim û hûn
ê bizanibin ku, ez XUDAN im. 12
Û ez ê li ser we mirovan, netewa
xwe Îsraêlê bidim meşandin û dê
te ji xwe re bikin milk û tuyê bibe
mîrasa wan û carekî din tuyê wan
ji zarokên wan neke. 13 Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Madem ku
ji te re: Tu welatekî zilaman di-
xwe û netewa xwe bêyî zarokên
wan dihêle yî dibêjin; 14 ji ber vê
yekê êdî tuyê zilam nexwe û êdî
tuyê netewa xwe ji zarokên wan
ve neke, gotina Xudan, XUDAN
15 û êdî ez ê şermezarkirina ne-
teweyan ji te re nedim bihîstin û
êdî tuyê heqareta ku neteweyan
kirine hilnegire û êdî tuyê netewa
xwe neçerixîne, gotina Xudan,
XUDAN.
16 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 17 Lawê mirov, hîn mala Îs-
raêlê li ser axa xwe rûniştîbûn, bi
rêyên xwe û bi karên xwe wê min-
dar kirin; li hemberî min rêya wan
mîna mindariya pîrekê ya di rewşa
wê yî gemariyê de bû. 18 Xeyda
xwe bi ser wan ve rijandim, ji ber
ku li ser welêt xwînê rijandin û bi
pûtên xwe wê mindar kirin. 19 Û
wan di nav neteweyan de belav
kirim û li welatan belav bûn; li
gor rêyên wan û li gor karên wan
darazdinê li wan kirim. 20 Di nav
netewan de, li her cîhê ku diçûnê,
navê minî pîroz qirêj kirin; ji ber
ku bona wan: Ev netewa XUDAN
e, çawa ku wusa bû, dîsa jî mecbûr
man ku ji welatê xwe ve derketin,
hate gotin! 21 Ez bona xîreta navê
xwe yî pîroz, yê ku gelê Îsraêlê di
nav neteweyên ku çûyîne de qirêj
kirine, xemgîn bûm.
22 Ji ber vê yekê ji mala Îsraêlê

[1] An jî: Min sond da.

re bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Ya mala Îsraêlê, vêya ne
di oxra we de, lê di oxra navê
xwe yî pîroz de, ê ku we di nav
gelên ku hûn çûne cem wan xera
kirin de dikim. 23 Û ez ê navê
xwe yî mezin, yê ku di nav ne-
teweyan de xera bûye, we di nav
wan de xera kirine pîroz bikim û
dema li ber çavên wan di we de
hatim pîroz kirin, dê neteweyan
bizanibin ku, ez XUDAN im,
gotina Xudan, XUDAN. 24 Ji
ber ku ez ê we ji neteweyan ve
rahêjim û ji hemû welatan ve bi-
dim hev û ez ê we bînim axa we.
25 Û ez ê ava paqij bi ser we ve
bireşînim û hûn ê paqij bibin û ez
ê ji hemû mindariya we û ji hemû
pûtên we, we paqij bikim. 26 Û
ez ê dilekî nû bidim we û ruhekî
nû bixim hundirê we û ez ê dilê
kevir ji hundirê we derxînim û
dilekî ji goşt bidim we. 27 Û ez
ê Ruhê xwe têxim hundirê we û
we di zagonên xwe de bimeşînim
û hûn ê bi daraziyên min ve bigi-
rin û bikin. 28 Û hûn ê li welatê
ku dame bapîrên we rûnin û hûn
ê bibin netewa min û ez ê bibim
Xwedayê we. 29 Û ez ê we ji
hemû mindariyê we xelas bikim
û ez ê bangî genim bikim û wê
zêde bikim û ez ê xelayê bi ser
we ve neynim. 30 Û bona ku hûn
di nav mirovan de êdî ruswayti-
ya xelayê nekişînin mêwa dar û
zadê zewiyê zêde bikim. 31 Wê
gavê hûn ê rêyên xwe yî xerab û
karên xwe yî neqenc di bîra xwe
de bînin û ji ber fesadiyên xwe û
ji karên xwe yî mekrûh hûn ê ji
xwe bikerihin.
32 Bizanibin ku, ez vêya di oxra
we de nakim, gotina Xudan, XU-
DAN, ji rêyên xwe bişermin û aciz
bibin, ya mala Îsraêlê! 33 Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Roja ku
we ji hemû fesadiyên we paqij
bikim, ez ê di bajaran de zilaman
bidim rûniştandin û dê cîhên xe-
rab bên ava kirin. 34 Û welatê ku
wêran bûye dê bête bikar anîn,
ya rastî ew di çavê her zilamê ku
ji wir derbas dibe de wêraneyek
bû. 35 Û dê bibêjin: Ev warê ku
wêran e, bû mîna bexça Adenê û
dîwarên bajarên ku xera û wêran
bûyîne û hatine xera kirin, hatin
ava kirin û di hundirê wan de tête
rûniştin. 36 Wê gavê neteweyên li
dora we ji ber mayîne dê bizani-
bin ku ez, XUDAN, cîhê ku xera
bûne min çêkir û yê ku bûye çol
min çikand; ez, XUDAN, min got
û ez ê bikim.
37 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ji ber vê yekê, bona ku ez ji bo
wan vêya bikim, ez ê dîsa li mala
Îsraêlê re xwe bidim gerandin; ez
ê wan mîna keriyê bi mirovahî
zêde bikim. 38 Keriyê qurbanê
çawa be, di cejnên wanî eşkere de
keriyê Orşelîmê çawa be, dê ba-

jarên xerabe jî bi keriyên mirovan
ve wusa tijî bibin û dê bizanibin
ku, ez XUDAN im!

*Hestiyên Miriyan*

Zeb 85,7; Rom 11,15; 5.Mûs 30,1-5

37 Destê XUDAN li ser min
bû û di Ruhê XUDAN
de min derxist derve û min danî
nava newalê û newal bi hesti-
yan ve tijî bû. 2 Ji ser wan, ji her
alî ve min derbas kir û a vay, li
rûyê deştê hestiyan zehf pirr bûn
û a vay, zehf hişk bûbûn. 3 Û ji
min re got: Lawê mirov, ma ev
hestiyan dikarin bivejin? Û min:
Ya Xudan, XUDAN tu pê dizanî!
gotim. 4 Û ji min re got: Li ser
van hestiyan peyxambertiyê bike
û ji wan re bibêje: Hestiyên hişk,
gotina XUDAN guhdarî bikin!
5 Xudan, XUDAN ji van hestiyan
re wusa dibêje: A vay, ez ê hilmê
têxim hundirê we û hûn ê bivejin.
6 Û ez ê masûlkeyan deynim ser
we û li ser we goşt biafirînim û ez
ê bi çerm dorên we bigirim û ez
ê hilmê têxim hundirê we û hûn
ê bivejin û hûn ê bizanibin ku, ez
XUDAN im!
7 Û mîna ku emir ji min re hati-
ye dayîn peyxambertiyê kirim û
dema min peyxambertiyê dikir,
şemateyek bû û a vay, hejînek û
wekî ku hestî li gor hestî be, hestî
bi hev û din re yek bûn[1]. 8 Û nihêr-
tim û a vay, li ser wan masûlkeyan
hebûn û goşt çêbû û ji ser ve çerm
bi ser wan girtin; lê belê di wan
de hilm tunebû. 9 Û ji min re got:
Ji bayê re peyxambertiyê bike,
peyxambertiyê bike, lawê mirov
û ji bayê re bibêje: Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Ya hilm, ji çar
bayî ve were, li ser van zilamên
ku hatine kuştin pif bike ku bila
bivejin! 10 Û mîna ku emir daye
min peyxambertiyê kirim û hilm
ket hundirê wan û vejiyan û li ser
pêlên xwe ve sekinîn, artêşekî
zehf, zehf mezin.
11 Û ji min re got: Lawê mirov,
van hestiyan, ew hemûya mala
Îsraêlê; a vay, ew: Hestiyên me
hişk bûn û hêviya me tune bû;
em qediyan dibêjin. 12 Ji ber
vê yekê peyxambertiyê bike û ji
wan re bibêje: Xudan, XUDAN
wusa dibêje: A vay, ez ê gorên
we vekim û ez ê we ji gorên we
derxînim, ya netewa min û ez ê
we bînim axa Îsraêlê. 13 Û dema
gorên we vekim û we ji gorên we
ve derxînim, ya netewa min, hûn
ê bizanibin ku ez XUDAN im!
14 Û ez ê Ruhê xwe têxim hun-
dirê we û hûn ê bivejin û ez ê we
daynim ser axa we û hûn ê bizani-
bin ku ez XUDAN, min got û min
kir, gotina XUDAN.

[1] An jî: Hestî nêzîkî hev bûn.

### *Cihûda û Îsraêl dibin yek*

Yêr 23,3-6; Lûq 1,31-33

15 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 16 Û tu, lawê mirov, ji xwe
re çoyekê rahêle û li ser wê, bona
Cihûdayê û bona lawên Îsraêl yên
ku hevalên wî ne binivîsîne û çoye-
kî din rahêle û li ser wê bi gotina:
Bona Ûsiv, çoyê Efrayîm û bona
hemûya mala Îsraêlê yên hevalên
wî binivîse 17 û mîna çoyekî ji xwe
re wan pev re bide cem hev û bila
di hundirê destê te de yek bibin.
18 Û dema lawên netewa te, bi go-
tina: Ma li gor te ev çi ne, gelo tuyê
ji me re nebêje? ji te re bibêjin;
19 ji wan re bibêje: Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: A vay, ez ê çoyê
Ûsiv, yê ku di destê Efrayîm de ye û
hevalên wî ezbetên Îsraêlê rahêjim
û ez ê wan tevî çoyê Cihûdayê
bikim û ez ê wan bikim çoyekê û
dê di destê min de yek bibin! 20 Û
çoyên ku te li ser wan nivîsandiye,
dê li ber çavên wan di destê te de
bin. 21 Û ji wan re wusa bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje: A
vay, ez ê lawên Îsraêl, ji neteweyên
ku çûne nav wan rahêjim û wan ji
her alî bidim hev û ez ê wan bînim
axa wan 22 û ez ê wan li welêt, li
ser çiyayên Îsraêlê bikim netewe-
yek tekane û dê qiralek ji hemûyên
wan re bibe qiral û êdî dê nebin du
netewe û êdî carekî din, dê bi du
qiraletiyê ve cuda nebin 23 û êdî
dê bi pûtên xwe ve û bi tiştên xwe
yî sik û bi gunehên xwe ve xwe qet
mindar nekin û ez ê wan ji her cîhê
ku lê rûdinin û tê de sûcê dikin xe-
las bikim û ez ê wan paqij bikim
û dê ew ê bibin netewa min û ez ê
bibim Xwedayê wan.
24 Û dê qûlê min Dawid li ser
wan bibe qiral û dê ji wan giştikan
re bibe şivanekî tekane; dê di da-
raziyên min de bimeşin û dê bi
zagonên min ve bigirin û dê wan
bikin. 25 Û dê li welatê ku dayî-
me qûlê xwe Aqûp, yê ku bapîrên
we tê de rûdinin ve rûninê û dê ew
û lawên wan û lawên lawên wan,
heta abadînê dê li wir rûninê û
dê qûlê min Dawid heta abadînê
bibe begê wan. 26 Û ez ê bi wan
re peymana xweşiyê daynim, dê
bi wan re bibe peymanekî abadîn
û ez ê wan bi cîh bikim û ez ê
wan zêde bikim û perestgeha xwe
heta abadîn ez ê deynim nav wan.
27 Û dê şunwara min li ser wan
be û ez ê bibim Xwedayê wan û
dê ew ê bibin netewa min. 28 Û
heta ku perestgeha min heta
abadînê di nava wan de bimîne, dê
neteweyan bizanibin ku, ez XU-
DANê ku Îsraêlê pîroz kiriye me.

### *Gog tête darazkirin*

Pey 20,7-10

38 Û vê gotina XUDAN ji
min re hat: 2 Lawê mirov,
berê xwe bide Gogê ji welatê
Magogê begê Roşûn, Meşekîn

û Tûbalê ye û li dijî wî peyxam-
bertiyê bike 3 û bibêje: Xudan,
XUDAN wusa dibêje: Gogê begê
Roşûn, Meşekîn û Tûbalê, a vay,
ez li dijî te me 4 û ez ê te şunda
vegerînim û ez ê çanqilan bi çen-
ga te ve bikim û ez ê te û hemûya
artêşa te, hespan û siwaran, aja-
weya mezin yên gişt kincên giran
li xwe kirine û bi mertala biçûk
û ya mezin in û ya ku gişt şûr
dişixulînin, 5 tevî wan Fars û Kûş
û Pûta ku gişt bi kumzirx û mertal
in; 6 Gomerê û hemû artêşên wê;
ji dawiyên bakur mala Togarma û
hemû artêşên wê, bi te re ez ê pirr
neteweyan derxînim!
7 Tu, tevî ajaweya mezin ya li
cem te civiyane amade be û xwe
amade bike, dê yê ku wan biparê-
ze tu be. 8 Paşî pirr deman dê
sehêtî li te bête kirin; tuyê di salên
dawîn de were warê ku ji şûr ve
hatiye xelas kirin, ji yên ku ji pirr
neteweyan ve bona çiyayên Îs-
raêlê hatine civandin re were, ew
çiyayên ku, xerabeyek her timî
bû; lê belê dê wusa bibe ku ew ê ji
neteweyan hatibin derxistin û gişt
di ewlekariyê de rûniştî bin. 9 Û
tuyê derkeve, tuyê mîna bahozekê
were, tu û hemû artêşên te û pirr
neteweyên bi te re, bona ku der
û hêl li welêt bigirin hûn ê bibin
mîna ewrekê.
10 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Dê ew roja wusa bibe ku, dê hin-
ek tişt bên aqlê te û tuyê ramanên
xerab bifikire 11 û tuyê bibêje: Ez
hilkişim warê gundên bêdîwar, ez
bi ser yên ku di rehetiyê de ne û di
ewlekariyê de rûdinin herim, gişt
bêyî dîwar rûniştine û çilmêreyên
deriyên wan û deriyên wan nîne.
12 Tuyê bona talan û yexme kirinê
û bona ku li dijî cîhên çawa xera
bûbûn, lê niha mirov lê rûdininê
û neteweya ku ji gelan ve hatine
civandin destê xwe bizivirîne
hilkişe, ew netewa ku dewar û
mal qezenc kiriye; di navika dinê
de rûdinê. 13 Bazirganên Şeba û
Dedan û Tarşîşê û hemû şêrên wê
yî ciwan dê ji te re bibêjin: Ma
qey tu bona rahiştina malê talanê
hat? Ma te bona talanê ajaweya
xwe civand? Kişandina zîv û zêr,
rahiştin û birina dewar û malê,
ma bona kirina talana mezin e?
14 Ji ber vê yekê, ya lawê mirov,
peyxambertiyê bike û ji Gog re
bibêje: Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Ma roja ku netewa min
Îsraêl di ewlekariyê de rûnê, tuyê
wê rojê hîn nebe[1]? 15 Û tu û tevî
te pirr neteweyan, gişt li hespan
siwar bûyî, wekî ajaweyek me-
zin û artêşek xwurt bin, ji dawi-
yên bakurê, ji cîhê xwe ve were
16 û tuyê, bona ku warê buxumî-
ne mîna ewrekê derkeve hemberî
netewa min Îsraêlê; dê di rojên

[1] Fêhm nekî, nebihîzî, an jî: Nezanî?

dawîn de wusa bibe ku, dema ez
li ber çavên neteweyan di te de
bêm pîroz kirin, ya Gog, bona ku
ew min binasin, ez ê te li dijî warê
xwe bînim!
17 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ma ew zilamê ku, bi navdîtiya
qûlên min peyxamberên Îsraêlê,
yên ku di wan rojan de bi salan
peyxambertiyê kirine ve di der-
heqê wî de gotibûm: Ez ê li dijî
wan te bînim, tu yî? 18 Û dema
Gog li dijî warê Îsraêlê were, go-
tina Xudan, XUDAN, dê wê rojê
wusa bibe ku, ez ê agir bipejiqî-
nim. 19 Ji ber ku bi çavnebarti-
ya xwe û bi agirê xezeba xwe ve
gotim: Bi rastî dê wê rojê li warê
Îsraêlê hejînek mezin bibe! 20 Û
masiyên behrê û civîkên ezmanan
û heywanên beyarê û hemûyên ku
li erdê ve dixirxir in û hemû miro-
vên ku li ser erdê ne, dê ji ber min
bilerizin û dê çiya xera bibin û dê
kendal bikevin û her dîwar bi erdê
ve yek bibin. 21 Û ez ê li dijî wê
bi gotina şûr, ji hemû çiyayên xwe
ve bang bikim, gotina Xudan, XU-
DAN; dê şûrê her kesî li dijî birayê
xwe be. 22 Û ez ê bi webayê û bi
xwînê darizînê bikim û bi ser wî û
bi ser artêşên wî ve û li ser gellek
neteweyên ku li cem wî ne, barana
bicoş û hebên girs yên zîpikê, agir
û kewkurdê bibarînim. 23 Û ez
ê xwe mezin bikim û xwe pîroz
bikim û ez ê di çavê gellek nete-
weyan de xwe bidim nasîn û dê
bizanibin ku, ez XUDAN im!

*Gog Mexlûb dibe*

Zeb 76

39 Û tu, lawê mirov, li
dijî Gog peyxambertiyê
bike û bibêje: Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Gogê begê Roşûn,
Meşekîn û Tûbalê, a vay, ez li dijî
te me 2 û ez ê te şunda vegerînim
û ez ê te pêş ve bibim û ez ê te ji
dawiyên bakurê ve derxînim û ez
ê te bînim ser çiyayên Îsraêlê 3 û
ez ê ji destê te yî çepê kevana te
û ji destê te yî rastê tîrên te lêxim
û bixînim. 4 Tuyê tevî hemû
artêşên xwe û bi neteweyên ku li
cem te ne, li ser çiyayên Îsraêlê
bikeve; bona ku bixwin ez ê te
bidim her tewrên civîkên jakaw[1]
û cenawirên beyarê. 5 Tuyê li
beyara vekirî bikeve! Ji ber ku
min got, gotina Xudan, XUDAN.
6 Û ez ê agir bi ser Magogê û
bi ser yên ku li giraveyan di
ewlekariyê de rûdinin ve bişînim
û dê bizanibin ku, ez XUDAN
im. 7 Û ez ê di nav netewa xwe
Îsraêlê de, navê xwe yî pîroz
bidim nasîn û êdî ez ê navê xwe
yî pîroz nedim xera kirin û dê
netewe bizanibin ku, XUDANê li
Îsraêlê Pîroz e, ez im. 8 A vay, tê û
dê bibe, gotina Xudan, XUDAN;

*1* Dirinde.

roja ku gotime ev roj e. 9 Û yên
ku li bajarên Îsraêlê ve rûdinin dê
derkevin û bi çekên xwe ve agir
vêxin û dê wan, mertalê biçûk jî,
mertalê mezin jî, kevanê jî, tîran jî,
çoyên dest jî riman jî bişewitînin
û dê bi vana heft salî agir vêxin
10 û dê ji beyarê êzing nekişînin
û ji daristanan ve jênekin; ji ber
ku dê bi çekan agir vêxin û yên ku
xwe kirine talan, talan bikin û dê
yên ku xwe kirine yexme, yexme
bikin, gotina Xudan, XUDAN.
11 Û dê wê rojê wusa bibe ku, ez
ê li rojhilatê behrê, di newala Der-
basdibinan de[1] cîhê gorê bidim
Gog û ew ê yên ku ji wir derbas
bibin bisekinîne û dê li wir Gog
û hemû ajaweya wî binax bikin û
dê ji wir re Newala Hamon-Gog[2]
bêje gotin. 12 Û bona ku welêt
paqij bikin, mala Îsraêlê dê heft
mehî wan binax bikin[3]. 13 Û dê
hemû neteweya welêt wan binax
bikin û roja ku ji wan re mezin-
tiyê bibînim, dê nav û deng bibe;
gotina Xudan, XUDAN. 14 Û li
ser domahîkê, zilamên ku der-
bas bibin û zilamên ku tevî wan
yên ku dê derbas bibin, bona ku
welêt paqij bikin, yên ku dê li ser
erdê mayîne paqij bikin, dê ji nav
welêt ve cihê bikin; dê ew, li pêy
heft mehî lêkolînê bikin. 15 Û yên
ku dê ji hundirê welêt ve derbas
bibin, dê derbas bibin û dema yek
hestiyê mirov bibîne, heta ku yên
binax bikin wê di çemê Hamon-
Gogê de binax bikin, dê nîşanekê
deyne cem wê. 16 Û dê Hamona
jî bibe navê bajarekî. Dê welêt
paqij bikin.
17 Û tu, lawê mirov, Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Ji her tewrê ci-
vîkan û ji hemû cenawirên beyarê
re bibêje: Bicivin û werin; bona
qurbanê ku ez ê ji bo we serjê
bikim, ji qurbana mezin ya ku li
ser çiyayên Îsraêlê ye, ji her alî
ve bicivin û goşt bixwin û xwînê
vexwin! 18 Hûn ê goştê egîdan
bixwin û xwîna begên dinê, xwî-
na beranan, berxikan û nêriyan,
ganêran vexwin, gişt heywanên
qelew yên Başanê ne. 19 Û hûn ê
ji qurbana ku bona we serjê kirime,
heta ku têr bibin bez bixwin û heta
ku hûn serxweş bibin hûn ê xwînê
vexwin. 20 Û hûn ê li sifra min ji
hespan û ji erebeyên cengê, ji egî-
dan û ji hemû mêrên cengê ve têr
bibin, gotina Xudan, XUDAN.
21 Û ez ê di nav neteweyan de
bilindahiya xwe nîşan bidim û
dê hemû netewe, daraziya min,
ya ku dimeşînim û destê xwe, yê
ku danîme ser wan bibînin. 22 Û
mala Îsraêlê dê ji wê rojê û ji wê

1 An jî: Di newala Abarîmê de.
2 Gelê Gog.
3 Dê heft meh di binax kirina wan de bidomînin.

wêdetir bizanibin ku ez Xwedayê
wan XUDAN im. 23 Û dê nete-
weyan bizanibin ku, mala Îsraêlê
ji ber fesadiyên xwe çûn sirgûnê,
ji ber ku xayîntiyê bi min re ki-
rin û min wecê xwe ji wan veşart
û wan dam destên neyarên wan
û gişt bi şûr ve ketin. 24 Li gor
mindariyên wan û li gor gunehên
wan, li wan kirim û wecê xwe ji
wan veşartim.
25 Ji ber vê yekê Xudan, XUDAN
wusa dibêje: Ez ê sirgûnên Aqûp
niha şunda bînim û ez ê dilovaniyê
li hemûya mala Îsraêlê bikim û ez
ê bona navê xwe yî pîroz çavne-
bar bibim. 26 Û dê şermezariyên
xwe û hemû xayintiyên xwe yî li
min kirine hilgirin û wê gavê dê
li ser axên xwe di ewlekariyê de
rûnin û kesî ku bitirsîne dê tune be;
27 wê dema ku, ez ê wan ji nete-
weyan şûnda anîbim û ji ber welatên
neyarên wan, ez ê wan civandî bi-
bim û li ber çavên gellek netewe-
yan, ez ê di wan de bêm pîroz ki-
rin. 28 Û ji ber ku min wan di nav
neteweyan de sirgûn kiriye û ji ber
ku li axên wan jî min wan civandi-
ye, dê bizanibin ku, ez Xwedayê
wan XUDAN im û êdî li wir ez ê
ji wan tu kesî nehêlim 29 û êdî ez ê
wecê xwe ji wan veneşêrim; ji ber
ku Ruhê xwe bi ser mala Îsraêlê ve
rijandim, gotina Xudan, XUDAN.

*Xewn û Xeyalê di derbarê Perestgeha Nû de*

40 Di bîst û pênc saliya sir-
gûniya me de, di serê salê
de, di roja dehan ya mehê de,
paşî lêxistina bajêr di sala çardeh
de, tam di wê rojê de, destê XU-
DAN li ser min bû û min bir wê
derê. 2 Di xewn û xeyalên xwe
de Xwedê min bir warê Îsraêlê û
min danî ser çiyayekî herî bilind
û li başûr, li ser wê mîna avahiya
bajarekî hebû. 3 Û min bir wir û
a vay, zilamek xuyabûna wî mîna
xuyabûna tûncê û di destê wî de
tayekî ji kitanê û qamirkî pîvanê
hebû û di derî de disekinî. 4 Û
zilam ji min re got: Lawê mirov,
bi çavê xwe ve bibîne û bi guhên
xwe ve bibihîze û li her tiştê ku ez
ê nîşanî te bidim baş binêre; ji ber
bona ku ez nîşanî te bidim, tu bi
vir ve hate anîn; her tiştên ku tuyê
bibînî nîşanî mala Îsraêlê bide!

*Deriyê Rojhilatê*

5 Û a vay, li dervê malê li hember
dorê dîwarek û di destê zilamekî
de qamira pîvanê ya dirêjiya wê
şeş gez[1], her gezekî wê gezek
û çar tilîk bû û qalindiya dîwêr
pîva; qamirek bû; bilindahiya
wê jî qamirek. 6 Û hat deriyê ku
li rojhilatê dinêre û ji pêlikan ve
hilkişî û şêmûga derî pîva, fire-
hiya wê qamirek bû; şêmûga din
jî pîva, firehiya wê qamirek bû.

---

1 Li rasteka menan binêrin.

7 Û dirêjiya her şaneyî qamirek û
firehiya wê jî qamirek bû û nav-
bera şaneyan pênc gez û şêmûga
derî ya ku li cem xeşîmeya deriyê
ku berbi xanî ye qamirek bû. 8 Û
xeşîmeya derî berbi xanî pîva, qa-
mirek bû. 9 Û xeşîmeya derî pîva,
heyşt gez bû û sitûnên[1] wê pîva,
du gez û xeşîmeya derî berbi xanî
bû. 10 Û şaneyên deriyê ku berbi
rojhilatê, li vî alî sisê û li wî alî sisê
bûn; pîvana her sisêyan yek bû û ji
vî alî û ji wî alî pîvana sitûnan yek
bû. 11 Û firehiya cîhê ketina derî
pîva, deh gez û dirêjiya derî sêz-
deh gez bû 12 û li ber şaneyan, ji
vî alî dîwarekî qeraxê yê gezekî û
ji wî alî dîwarekî qeraxê yê gezekî
hebû û şaneyan ji vî alî şeş gez û
ji aliyê din şeş gez bûn. 13 Û ji
ser xaniyê şaneyekê heta ser xani-
yê din pîva, wekî derî li hemberî
derî be di firehiya bîst û pênc gezî
de bû. 14 Û sitûnan çêkir, şêst gez
û hewş ji qeraxên derî heta sitûn-
an bû. 15 Û ji rûyê deriyê li cîhê
ketinê, heta rûyê xeşîmeya deriyê
hundir pêncî gez bû. 16 Û li aliyê
hundir yê derî li her alî şivakeyên
bi qefes yên şaneyan û dîwarên
çaviyê hebûn, di xeşîmeyan de jî
wusa bû û bi dor û ber ji aliyên
wê yî hundirîn jî şivake hebûn û
li ser dîwarên çaviyê darên xurmê
hebûn.

*Hewşa Derve*

17 Û min anî hewşa derve û a
vay, ode û raxêra kevir yên bona
hewşê hatine avakirin hebûn; li
ser raxêrê sih ode hebûn. 18 Û
raxêra kevir ya ku li cem deriyan
e, raxêra jêrîn, wekî dirêjiya derî
bû. 19 Û firehiya ku ji ber deriyê
jêrîn heta hewşa hundir ji derve
pîva, sed gez bû; li rojhilatê û li
bakur jî wusa bû.

*Deriyê Bakur*

20 Û deriyê hewşa derve yê ku li
bakur dinêre, dirêjiya wê û fire-
hiya wê jî pîva. 21 Û şaneyên wê
ji vî alî sisê û ji wî alî sisê bûn;
dîwarên wê yî çaviyê û xeşîmeyên
wê li gor pîvana deriyê yekemîn
bûn; dirêjiya wê pêncî gez û fire-
hiya wê bîst û pênc gez bû. 22 Û
şivakeyên wê û xeşîmeyên wê û
darên wê yî xurmê, li gor pîvana
deriyê ku li rojhilatê dinihêre bûn
û bi heft pêlikê hildikişiyan wê û
xeşîmeyên wê li ber wan bû. 23 Û
li hemberî deriyê bakur û deriyê
rojhilatê, bona her yekê deriyek
hewşa hundirê hebû û ji derî heta
derî pîva, sed gez bû.

*Deriyê Başûr*

24 Û min ber bi başûrê ve meşand
û a vay, berbi başûrê deriyek
hebû û dîwarên wê yî çaviyê û
xeşîmeyên wê pîva, li gor van
pîvanan bûn. 25 Û di wê de û li

---

1 Sing.

hember dorê di xeşîmeyan de,
mîna wan şivakeyan şivake he-
bûn; dirêjî pêncî gez û firehî jî
bîst û pênc gez bû. 26 Û bona ku
hilkişin wê, heft pêlik hebûn û
xeşîmeyên wan li pêşiya wan bû
û li ser dîwarên çaviyê darên xur-
mê hebûn; yek li vî alî, yek jî li
aliyê din bû. 27 Û deriyekî hewşa
hundir, yê ber bi başûr hebû û ber
bi başûr ji derî heta derî pîva, sed
gez bû.

*Deriyê Hewşa Hundirîn*

28 Û min ji deriyê başûrê anî
hewşa hundir û deriyê başûrê
pîva, li gor van pîvanan bû 29 û
şaneyên wê, dîwarên wê yî çaviyê
û xeşîmeyên wê li gor van pîvanan
bûn û di wê de û di xeşîmeyan de li
hember dorê şivake hebûn; dirêjî
pêncî gez û firehî jî bîst û pênc
gez bû. 30 Û li her alî xeşîmeyên
dirêjiyên wan bîst û pênc gez û
firehî jî pênc gez in hebûn. 31 Û
xeşîmeyên wê ber bi hewşa der-
ve bûn û li dîwarên çaviyê darên
xurmê hebûn û bona hilkişandina
wê, heyşt pêlik hebûn.
32 Û min ber bi rojhilatê anî
hewşa hundir û derî pîva, li gor
van pîvanan bû 33 û şaneyên wê,
dîwarên wê yî çaviyê û xeşîmeyên
wê li gor van pîvanan bû û di wê
de û di xeşîmeyan de li hember
dorê şivake hebûn; dirêjî pêncî
gez û firehî jî bîst û pênc gez bû.
34 Û xeşîmeyên wê ber bi hewşa
derve bûn û ji vî alî û ji wî alî, li
dîwarên çaviyê darên xurmê he-
bûn û bona hilkişandina wê, heyşt
pêlik hebûn.
35 Û min anî deriyê bakur û wê
pîva, li gor van pîvanan bû 36 û
şaneyên wê, dîwarên wê yî çaviyê
û xeşîmeyên wê jî û di wê de, li
hember dorê şivake hebûn; dirêjî
pêncî gez û firehî jî bîst û pênc
gez bûn. 37 Û sitûnên wê ber bi
hewşa derve bûn; ji vî alî û ji wî
alî, li dîwarên çaviyê darên xur-
mê hebûn û bona hilkişandina wê,
heyşt pêlik hebûn.

*Odeyên ku Qurban tê de têne amadekar kirin*

38 Û li cem sitûnên derî ode-
yek û deriyê wê hebû; pêşkêşiya
şewitandinê li wir dişuştin. 39 Û
bona ku pêşkêşiya şewitandinê û
pêşkêşiya sûcê û pêşkêşiya gu-
nehê li ser serjê bikin, di xeşîmeya
derî de li vî alî du sifre û li wî alî
du sifre hebûn. 40 Û cîhê derketi-
na[1] deriyê bakur, ji derve li aliyekî
du sifre û li wî alî û li aliyê dinî
li aliyê xeşîmeya derî ye du sifre
hebûn. 41 Li cem derî, çar sifre
li aliyekî û çar sifre li aliyê din
bûn; heyşt sifreyên ku li ser wan
qurban tên serjê kirin bûn. 42 Û
bona pêşkêşiyên şewitandinê, çar

1 Hilkişandina.

sifreyên ji kevirên qewartî, yên ku
dirêjiya wan gezek û nîv û fire-
hiya wan gezek û nîv û bilindahi-
ya wan gezek û nîv bûn; taximên
ku bona pêşkêşiya şewitandinê
û bona qurbanê serjê bikin bikar
dianîn, datanîn ser wan. 43 Û
çanqilên ku dirêjiya her yekî çar
tilî ne li hember dorê bi xanî ve
hatibûn kutandin û li ser sifreyan
goştê qurbanê hebûn.

*Odeyên ku ji Kahînan re hatine cihê kirin*

44 Û li hewşa hundir ya ku li cem
deriyê bakur e, li aliyê derveyî
deriyê hundir bona qesîdevanan
odeyan hebûn û berê wan li başûrê
bûn; yek li cem deriyê rojhilatê,
wecê wê ber bi bakur bû. 45 Û
ji min re got: Ev odeya ku berê
wê li başûrê ye, bona kahînên ku
notirvaniya xanî digirine ye 46 û
odeya ku berê wê li bakur e, bona
kahînên ku notirvaniya pêşkêşiyê
digirine ye; vana ji lawên Lêwî,
lawên Tsadok yên ku bona xiz-
metê ji XUDAN re bikin nêzîkî
wî bûne ne. 47 Û hewşê pîva,
dirêjî sed gez û firehî sed gez bû,
çar alî wekhev bûn û pêşkêşîgeh
li ber xanî bû.

*Perestgeh*

48 Û min anî xeşîmeya xanî û du
sitûnên xeşîmeyê pîva, ji vî aliyî
pênc gez û ji wî alî pênc gez bû û
firehiya derî ji vî alî sê gez û ji wî
alî sê gez bû. 49 Dirêjiya xeşîmeyê
bîst gez, firehiya wê yanzdeh gez
bû; bi pêlikan hildikişiya wê û li
cem singan sitûn hebûn; yek li vî
alî û yek jî li aliyê din bû.

**41** Û min anî perestgehê û
singan pîva, firehiya wê ji
vî alî şeş gez, ji wî alî şeş gez, li
gor firehiya çadirê bû. 2 Û firehiya
cîhê ketinê deh gez bû û sermilên
cîhê ketinê, ji vî alî pênc gez û ji
wî alî pênc gez bûn û dirêjiya wê
pîva, çel gez bû û firehiya wê bîst
gez bû. 3 Û ket aliyê hundir û her
singên cîhê ketinê pîva, du gez bûn
û cîhê ketinê şeş gez bû û firehiya
cîhê ketinê heft gez bû. 4 Û dirêji-
ya wê pîva, bîst gez bû û firehiya
wê li ber Perestgehê bîst gez bû û
wî ji min re got: Cîhê Herî Pîroz
ev e!
5 Û dîwarê xanî pîva, şeş gez bû û
li hember dorê her aliyê xanî, her
alî firehiya xanî çar gez bû. 6 Û
odeyên kêlekê sê qat bûn, ode li
ser odê, li her qatî sih û li hem-
ber dorê, dîwarê xanî yê ku bona
odeyên qeraxê bû diketin hundirê,
da ku, bila bi wê bigirin û bila bi
dîwarê xanî yê esil ve negirin.
7 Û her ku dor li xanî digirt û bi-
lindtir dibû, odeyên wê yî qeraxê
fireh dibûn; ji ber ku dorgirtina
xanî li dora xanî her ku diçû bi-
lind dibû; ji ber vê yekê firehiya

xanî berbi jor yek bû; bi vî awayî
ji odeya binî, bona hilkişandina
odeya herî jorîn, ji odeya navîn
ve derbas dibûn. 8 Û dîtim ku,
li hember dorê navkoyek bilind
yê xanî hebû; bingehên odeyên
qeraxê qamirekî bitûmî, yê ku şeş
gez e bû. 9 Li aliyê derve, qalindi-
ya dîwarê ku bona odeyên qeraxê
ne, pênc gez bû; cîhê vekirî dimî-
ne jî, ji odeyên qeraxê yên xanî
re bûn. 10 Û li hember dorê li her
aliyê xanî di navbera odeyan de
bîst gezî firehî hebû. 11 Û deriyên
odeyên qeraxê berbi cîhê ku vekirî
dimîne bûn, berbi bakur deriyek û
berbi başûr deriyekî din hebû û
bi hember dorê firehiya cîhê ku
vekirî dimîne pênc gez bû.
12 Û li aliyê ku berbi rojavayê
ye, firehiya avahiya li ber cîhê ku
hatiye cuda kirin, heftê gez bû û
qalindiya dîwarê avahiyê li hem-
ber dorê pênc gez bû û dirêjiya
wê nod gez bû. 13 Û xanî pîva,
dirêjiya wê sed gez bû û cîhê ku
hatiye cuda kirin û tevî dîwarên
wê avahî, di dirêjiya sed gezî de
bûn 14 û berbi rojhilatê firehiya
berê[1] malê û cîhê ku hatiye cuda
kirin sed gez bûn.
15 Û dirêjiya avahiya ku li ber
cîhê hatiye cuda kirin ya li paşî
avahiyê ye û eywanên wê yên
ku li vî alî ne û li wî alî ne pîva;
sed gez bûn û perestgeha hundir
û dalanên hewşê, 16 şêmûgên
wê û şivakeyên wê yî bi qefes û
eywanên wê yên li hember dorê
sê qat di ser wê de li hemberî
şêmûgê ne, ji erdê heta şivakeyan,
(şivake jî bi qefes bûn[2],) 17 heta
navberka ser derî, heta xaniyê
hundir û ji derve û ji cem hemû
dîwaran ji hundir ve û ji derve, bi
pîvanê li hember dorê bi textan ve
hatibûn girtin. 18 Û bi Kerûbiyan
û bi darên xurmê ve hatibûn
çêkirin; di nav du Kerûbiyan de
darekî xurmê hebû û du wecê
her Kerûbiyekî hebûn 19 û li vî
alî, berbi darê xurmê wecê zilam
hebû û li wî alî berbi darê xurmê
wecê şêrê ciwan hebû. Di hundirê
hemûya xênî de li çar hawirdorî
wusa hatibû çêkirin; 20 ji erdê
heta ser xanî bi Kerûbiyan û darên
xurmê hatibûn çêkirin; dîwarê
perestgehê wusa bû.
21 Û dema em werin perestgehê,
mircaqên derî çar qorzîk bûn û
dema em werin wecê Cîhê Herî
Pîroz, xuyabûna wê, mîna xuyabû-
na perestgehê bû. 22 Pêşkêşîgeh ji
darê bû, bilindahiya wê sê gez û
dirêjiya wê du gez bû û qozîkên
wê û tevî dirêjiya wê dîwarên wê
dar bûn û ji min re got: Sifra ku
li ber XUDAN e, ev e! 23 Û du
deriyê perestgehê û Cîhê Herî

1 Wec.

2 Yanê vedibûn û dihatin girtin.

Pîroz hebûn. 24 Û du bazikên her du deriyan, du bazikên wê yên ku dizivirîn hebûn; bona deriyekî du bazik û bona deriyê din du bazik bûn. 25 Mîna ku li ser dîwaran hatine çêkirin, li ser wan, li ser bazikên deriyên perestgehê jî Kerûbiyan û darên xurmê hatibûn çêkirin û li ber eywanê ji derve şêmûgekî darînî hebû. 26 Û li ser sermilên eywanê ji vî alî û ji wî alî şivakeyên bi qefes û darên xurmê hebûn; odeyên qeraxê yên xanî û şêmûg wusa bûn.

*Odeyên di Hewşa derve de*

42 Û ji rêya ku berbi bakurê ye min derxist hewşa derve û min anî odeya li hemberî avahiya ku berbi bakurê ye. 2 Li ber qama sed gezî deriyê bakur hebû û firehiya wê pêncî gez bû. 3 Li hemberî bîst gezî yê hewşa navîn û li hemberî raxêra kevirî yê hewşa derve, li sê qatî eywan li hemberî eywanê bû. 4 Û li ber odeyan cîhekî gerê hebû û firehiya wê ji hundir ve deh gez bû, rêyek sed gezî hebû û deriyên wê berbi bakur bûn. 5 Lê belê odeyên jorîn ji odeyên jêrîn û navîn hîn jî tengtir bûn; ji ber ku di avahiyê de eywanên jorîn ji wan zêdetir cîh girtibûn. 6 Ji ber ku di sê qatî de bûn û mîna sitûnên hewşê sitûnên wan tune bûn; ji ber vê yekê odeya li qatê herî jorîn, ji aliyê cîh, ji odeyên li qatên jêrîn û navîn in zêdetir teng bûn. 7 Û li derve li cem odeyên wê, li ber odeyan dirêjiya dîwarê ku berbi hewşa derve yî pêncî gez bû. 8 Ji ber ku dirêjiya odeyên li hewşa derve ne, pêncî gez bûn û ,a vay, li ber perestgehê sed gez hebû. 9 Û çawa ku ji hewşa derve diketin wan, cîhê ketinê, li aliyê rojhilatê, ji aliyê binî yê odeyan bû.

10 Û li ber cîhê ku hatiye cuda kirin û berbi rojhilatê di hundirê qalindbûna dîwarê hewşê de ode hebûn. 11 Û rêya ku di ber wan de bû, mîna xuyabûniya rêya odeyên ku berbi bakur in bû; dirêjiya wan çawa bin, firehiya wan jî wûsa bûn û hemû cîhên derketina wan, him jî li gor deriyên wan bûn. 12 Û mîna deriyên odeyên ku berbi başûrê ne, li serê rêgehê deriyek hebû, ew rê, dema diketin odeyan tam li ber dîwarê ku berbi rojhilatê ye bû.

13 Û ji min re got: Odeyên başûr û yên bakurê yên li ber cîhê ku hatine cuda kirinê ne, odeyên ku pîroz in ew in; kahînên ku li ber XUDAN xizmetê dikin, dê tiştê herî pîroz li wir bixwin; tiştên herî pîroz û pêşkêşiya nan û pêşkêşiya sûcê û pêşkêşiya gunehê dê deynin wê derê; ji ber ku ew cîh pîroz e. 14 Dema kahîn bikevin hundir, dê ji cîhê pîroz dernekevin hewşa derve, lê belê dê kincên xwe yî dema xizmetê dikin li xwe dikin

deynin wir; ji ber ku ew pîroz in û
dê kincên wekî din li xwe bikin û
nêzîkî yê aidî netewê ye bibin.
15 Û gava pîvandina xaniyê
hundir qedand, ji rêya deriyê ku
li rojhilatê dinêre ve min der-
xist û bi hawirdorê wê pîva.
16 Bi qamirê pîvandinê aliyê roj-
hilatê pîva, bi hawirdorê bi qa-
mirê pîvandinê pênc sed qamir.
17 Aliyê bakur pîva, bi hawir-
dorê bi qamirê pîvandinê pênc
sed qamir. 18 Aliyê başûr pî-
va, bi hawirdorê bi qamirê
pîvandinê pênc sed qamir.
19 Ziviri aliyê rojavayê û bi
qamirê pîvandinê pênc sed qa-
mir pîva. 20 Çar hawirdorê pîva;
bona yê pîroz ji yê rêze cuda bike
li hawirdorê dîwarê wê hebû,
dirêjiya wê pênc sed û firehiya wê
pênc sed bû.

*Rewnaqiya Xwedê vedigere Perestgehê*

1.Qir 8,10-13

43 Û min anî derî, deriyê ku
li rojhilatê dinêre. 2 Û a
vay, mezinahiya Xwedayê Îsraêlê
ji rêya rojhilatê ve hat û dengê wî
mîna dengê pirr avan bû û ji bilin-
dahiya wî erd dibiriqî. 3 Û mîna
xuyabûna xewn û xeyala ku dîti-
me, mîna xewn û xeyala ku dema
bona xerakirina bajêr hatibûm
dîtime bû û xewn û xeyalan, mîna
xewn û xeyala ku li cem çemê Ke-
barê dîtime bûn û bi ser dev û rû ve
ketim. 4 Û bilindahiya XUDAN ji
rêya deriyê ku li rojhilatê dinêre ve
ket xanî. 5 Û Ruh min rakir û anî
hewşa hundir û a vay, mezinahiya
XUDAN hundir dadigirt.
6 Û dengê yekî ku ji malê gotina
ji min re digot bihîstim û zilamek
li cem min sekinî. 7 Û ji min re
got: Lawê mirov, cîhê texta min
û cîhê biniyên lingên min, cîhê ku
ez ê abadîn di nav lawên Îsrêlê de
rûnim ev der e. Û dê mala Îsraêlê,
ew û qiralên wan, êdî bi fahşetiyên
xwe û li cîhên xwe yî bilind bi
laşên qiralên xwe navê minî pîroz
mindar nekin; 8 şêmûgên xwe li
cem şêmûga min û mircaqên xwe
li cem mircaqê min datanîn û di
navbera min û wan de tenê dîwarek
hebû û bi tiştên mekrûh ên ku kiri-
ne navê minî pîroz mindar kirin;
min jî bi hêrsa xwe wan qedandin.
9 Niha bila fahşetiyên xwe û laşên
qiralên xwe ji min ve dûr bikin; ez
ê jî abadîn di nav wan de rûnim.
10 Tu, lawê mirov, vê malê nîşanî
mala Îsraêlê bide ku, bila ji fesa-
diyên xwe ve şermezar bibin û
bila wêneya wê bipîvin. 11 Û ger
ji her tiştê ku kirine şerm bikin,
şiklê xanî û teşeyê[1] wê û cîhên wê
yî derketinê û cîhên wê yî ketinê û
hemû şiklên wê û hemû nîzamên
wê û hemû zagonên wê tevî şiklên

1 Dirûv, form.

wê ji wan re bighîne û li ber ça-
vên wan wê jî binivîse û bila bi
her şiklê wê û bi hemû nîzamên
wê ve bigirin û wan bikin. 12 Za-
gona xanî ev e: Li serê çiyê çar
hawirdor sînorên wê dê pirr pîroz
bibin. A vay, zagona xanî ev e.

*Pêşkêşîgeh*
2.Mûs 27,1-8

13 Û bi gezê pîvana pêşkêşîgehê
ev in; gez, gezek û çar tilîk in:
Bilindahiya navkoyê gezek û fire-
hiya qeraxa wê gezek û perwaza
qeraxê li çar hawirdorê gezek û dê
ev ê bibe navkoya pêşkêşîgehê.
14 Û ji navkoya erdê heta qera-
xa jêr, bilindahî du gez û firehiya
qeraxê gezek û ji qeraxa biçûk
heta qeraxa mezin bilindahî çar
gez û firehiya wê gezek. 15 Û
bilindahiya pêşkêşîgeha jor çar
gez û dê ji tifika pêşkêşîgehê ber-
bi jorê çar qiloç hebin. 16 Û çar
aliyê tifika pêşkêşîgehê, dirêji-
ya wê donzdeh gez û firehiya
wê donzdeh gez; çar alî wekhev.
17 Û li çar aliyê qeraxa jêr, dirêji-
ya wê çardeh gez, firehiya wê
çardeh gez û li her aliyê wê per-
waz nîv gez û navkoya wê bi çar
hawirdor gezek û dê pêlikên wê li
rojhilatê binêrin.
18 Û ji min re got: Lawê mirov,
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Di roja ku li ser pêşkêşîgehê de
pêşkêşiyên şewitandinê pêşkêş
kirin û bona ku xwînê li ser
bireşînin wê bikin, nîzamên wan
ev in: 19 Tuyê wekî ji kahînan
re pêşkêşiya sûcê be, ganêrekî
ciwan bide Lêwiyiyên ku ji nî-
jada Tsadok in, yên ku, bona
xizmetê ji min re bikin nêzîkî
min in, gotina Xudan, XUDAN.
20 Û tuyê ji xwîna wê rahêle û li
ser çar qiloçên pêşkêşîgehê û bi
ser çar qozîkên pêşkêşîgehê û li
çar hawirdorên perwazê ve bide;
bi vî awayî tuyê wê paqij bike û
tuyê bona wê kefaretê bike. 21 Û
tuyê ganêrê ku pêşkêşiya sûcê ye
rahêle û dê li derveyî pêşkêşîgehê,
li cîhê xanî yê ku hatiye bijartin
bête şewitandin. 22 Û roja du-
wemîn, tuyê wekî pêşkêşiya sûcê
be nêriyekî bêqisûr pêşkêş bike û
pêşkêşîgehê çawa bi ganêrê paqij
kiribin, dê wusa paqij bike. 23 Û
dema karê paqij kirinê qedand,
tuyê ganêrekî ciwan yê bêqisûr û
ji keriyê beranekî bêqisûr pêşkêş
bike. 24 Û tuyê wan nêzîkî ber
XUDAN bike û dê kahîn xwê
bavêjin ser wan û wekî pêşkêşiya
şewitandinê bin, dê wan ji XU-
DAN re pêşkêş bikin. 25 Heft
roj, wekî pêşkêşiya şewitandinê
bin, tuyê her roj nêriyekî amade
bike û ganêrekî ciwan yê bêqisûr
û ji keriyê beranekî jî amade bike.
26 Dê bona pêşkêşîgehê heft roj
kefaretê bikin û dê wê paqij bikin
û dê wê tirxan bikin. 27 Û dema

van rojan temam bikin dê wusa
bibe ku, roja heyştemîn û paşî
wê dê kahînan pêşkêşiyên we yî
şewitandinê û pêşkêşiyên we yî
xweşiyê li ser pêşkêşîgehê pêşkêş
bikin û ez ê ji we razî bibim, go-
tina Xudan, XUDAN.

*Yên ku dê xizmetê bikin*

44 Û min ji rêya deriyê der-
veyî perestgehê yê ku li
rojhilatê dinêre şunda anî û derî
girtîbû. 2 Û XUDAN ji min re
got: Dê ev derî girtî bimîne; ve-
nebe û dê tu kes jê derbas nebe; ji
ber ku Xwedayê Îsraêlê XUDAN
jê derbas bûye, ji ber vê yekê dê
girtî bimîne. 3 Ger beg be, ji ber
ku beg e bona ku li ber XUDAN
nan bixwe dê li wir rûnê; derî ji
rêya eywanê ve derbas dibe û ji
wê rêya ve derdikeve.
4 Û min ji rêya deriyê bakur ve
anî ber xanî û nihêrtim û a vay,
mezintiya XUDAN mala XU-
DAN dadigirt û bi ser dev û rû
ve ketim. 5 Û XUDAN ji min re
got: Lawê mirov, qenc binêre û bi
çavên xwe ve bibîne û hemû nîza-
mên mala XUDAN û bona hemû
zagonên wê, her tiştên ku ez ê ji
te re bibêjim bi guhên xwe ve bi-
bihîze û baş li her cîhê derketina
perestgehê û li cîhê ketina xanî
ve binêre. 6 Û tuyê ji wan asê-
yan re, ji mala Îsraêlê re bibêje:
Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ya mala Îsraêlê! 7 Gava we nanê
min, rûn û xwînê pêşkêş kirin, ji
bo hûn li perestgeha min bin û
wê û mala min mindar bikin, bi
xistina biyanên ku dilên wan bê-
sunet û goştên wan bêsunet in, ku
we xistine hundir, hemû tiştên we
yî mekrûh bona we pirr bûn û di
hemû tiştên we yî mekrûh de wan
peymana min xera kirin. 8 Û we
bi notirvaniya tiştên minî pîroz
negirtin û zilamên ku di perest-
geha min de bi notirvaniya min
bigirin we bona xwe danîn.
9 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Tu kesên ji hemû biyanên ku di
nav lawên Îsraêl de ne, biyanê ku
dilê wî bêsunet û goştê wî bêsunet
e, nekeve perestgeha min! 10 Lê
dema Îsraêl çewt bibe, Lêwiyiyên
ku ji min dûr bikevin, ji min cuda
bibin û li pêy pûtan herin, dê fe-
sadiyên xwe hilgirin. 11 Lê belê
dê ew ê di deriyê xanî de paraz-
kir û wekî li malê xizmetkar bin,
di perestgeha min de xizmetkar
bin; dê pêşkêşiya şewitandinê û
qurbana neteweyê serjê bikin û
bona ku ji wan re xizmetê bikin
li ber wan bisekinin. 12 Madem
ku li ber pûtên xwe ji wan re xiz-
metê kirin û ji mala Îsraêlê re ji
wan re bûn tilpekiya fesadiyê,
ji ber vê yekê destê xwe li dijî
wan rakirim, gotina Xudan, XU-
DAN û dê fesadiyên xwe hilgirin.
13 Û bona nêzîkî tiştên minî

pîroz, nêzîkî tiştekî herî pîroz bi-
bin, ji bo kahîntiyê bikin dê nêzîkî
min nebin û dê şermezariyên xwe
û karên mekrûh yên ku kirine hil-
girin. 14 Çawa ku wusa ye dîsa jî
wan bona xizmeta malê û her karê
ku di wê de dê bête kirin, bona pa-
rastina malê ez ê wan bikim no-
tirvan.
15 Lê dema lawên Îsraêl ji min
cuda bibin, Lêwiyiyan, kahînan,
lawên Tsadok yên ku notirvaniya
perestgeha min digirin, bona ku
xizmetê ji min re bikin, dê ew ê
nêzîkî min bibin û bona ji min re
rûn û xwînê pêşkêş bikin, ew ê li
ber min bisekinin, gotina Xudan,
XUDAN; 16 dê ew ê bikevin pe-
restgeha min û bona ku ji min re
xizmetê bikin, dê ew ê nêzîkî sifra
min bibin û dê bi notirvaniya min
ve bigirin. 17 Û dê wusa bibe ku,
dema bikevin deriyên hewşa hun-
dir kincên kitanî li xwe kiribin û
dema di deriyê hewşa hundir de
û di hundir de xizmetê bikin, dê
li ser wan ve rîs tune be. 18 Dê
di serê wan de pêçekên kitanî û
li pişta wan derpiyê kitanî hebe;
dê tiştekî ku xwêdanê dike li xwe
nekin. 19 Û dema derkevin hewşa
derve, li hewşa derve cem nete-
wê, dê kincên ku dema xizmetê
dikirin li ser wan bûn ji xwe der-
xinin û wan deynin odeyên pîroz
û bona ku bi wan kincên xwe ne-
tewê pîroz nekin; dê kincên wekî
din li xwe bikin. 20 Û dê serê xwe
kur nekin, porên xwe jî dirêj ne-
kin; lê dê porê serê xwe kur bikin.
21 Û dema bikevin hewşa hundir,
dê qet kahînek xemrê venexwe.
22 Û dê ji xwe re bi jinitî jinbî û
jina ku hatiye berdan neynin; lê ji
nîjada mala Îsraêlê qîzên ku neçû-
ne mêr, an jî pîrekek ku ji kahîn
ve bî mayî ye bînin. 23 Û cihêtiya
ku di nav ya pîroz û rêze de yî,
dê hînî netewa min bikin û dê ji
ya mindar ji ya paqij ve cuda ki-
rinê ji wan re bibêjin. 24 Û bona
ku darizînê bikin, dê ew ê di dozê
de bisekinin; dê li gor daraziyên
min li wî darizînê bikin û di hemû
cejnên minî eşkere de bi zagonên
min û şerîeta min ve bigirin û dê
Sebtên min pîroz bikin. 25 Û bona
ku xwe mindar nekin, dê nekevin
cem cesedê mirov jî; lê bona bav
û bona dayik û bona law û bona
qîz, bona bira û bona xwuşka bê
mêr bikaribin xwe mindar bikin.
26 Û piştî ku paqij bûne, dê bona
wê heft rojî bijmêrin. 27 Û roja
bona ku di perestgehê de xizmetê
bikin bikeve perestgehê, hewşa
hundir dê pêşkêşiya sûcê pêşkêş
bike, gotina Xudan, XUDAN.
28 Û mêrasa wan heye; ez mêrasa
wan im û hûn ê li Îsraêlê milkê
nedin wan; ez milkê wan im.
29 Pêşkêşiya nan û pêşkêşiya sûcê
û pêşkêşiya gunehê, dê ew ê vana
bixwin û her tiştên ku li Îsraêlê ha-

tine weqif kirin, dê bibe yên wan. 30 Û yekemînê hemû nûberên her tiştî û ji hemû pêşkêşiyên we yî rakirinê, dê her pêşkêşiya rakirinê yê her tiştî bibe yên kahînan, bona ku berdarî bikeve mala we, hûn ê pêşiyê hevîrên xwe bidin kahîn. 31 Dixwaze bila ji civîk be, dixwaze ji heywan be, dê kahînan ya ku bi xwe miriye an jî perçe bûye nexwin!

*Para XUDAN*

Hêz 48,8-22

45 Û dema hûn welêt wekî bi mêrasî be bi pişkê par bikin, hûn ê ji XUDAN re pêşkêşiyekî, ji welêt parekî pîroz pêşkêş bikin; dê dirêjiya wê bîst û pênc hezar gez û firehiya wê deh hezar gez be; li hawirdorê dê di her sînorê xwe de pîroz be. 2 Ji vêya bona cîhê pîroz, wekî çar alî wekhev bin, dirêjiya hawirdorê pênc sed û firehiya wê pênc sed û li dora wê, bona cîhê wê yî vekirî dê pêncî gez bin. 3 Û tuyê ji vê pîvanê bîst û pênc hezar gez dirêjî û deh hezar gez firehî bipîve û Perestgeh, Cîhê Herî Pîroz, dê li wê derê be. 4 Para welat ya pîroz e; dê bona kahînan û xizmetkarên perestgehê yên ku bona xizmetê nêzîkî XUDAN dibin be û dê bona malên wan bibe cîhek û dê bona perestgehê bibe şûnekî pîroz. 5 Û ji xizmetkarên malê re, ji Lêwiyiyan re, wekî ji wan re bi milkî, bona bîst heb ode, dê bîst û pênc hezar gez dirêjî û deh hezar gez firehî hebe. 6 Û bona wekheviya pêşkêşiya para pîroz hûn ê milkê bajêr tayîn bikin, dê firehiya wê pênc hezar gez û dirêjiya wê bîst û pênc hezar gez be; dê bona hemûya mala Îsraêlê be. 7 Û ji vî alî û ji wî aliyê pêşkêşiya para pîroz û milkê bajêr ve, li ber pêşkêşiya para pîroz û li ber milkê bajêr, ji aliyê rojava berbi rojava û ji aliyê rojhilatê berbi rojhilatê, dê ji beg re be û ji sînorê rojava heta sînorê rojhilatê di dirêjiyê de dê wekî parekê be. 8 Bi ax bûnê dê li Îsraêlê ji wî re bibe milk û begên min êdî dê zorê nedin netewa min û li gor ezbetên wê dê axê bidin mala Îsraêlê[1].

*Pêşkêşî û Rojên Pîroz*

3.Mûs 19,35-37; 5.Mûs 16,1-8; 4.Mûs 28,16-25; 3.Mûs 23,33-44

9 Xudan, XUDAN wusa dibêje: Ya begên Îsraêlê! Bona we bes bû; zordestiyê û zulûmkariyê rakin û dadî û rastiyê bikin! Destê xwe ji qewirandina netewa min ku ya ji erdên wan diqewirînin rakin,

1 Axên din, an jî: Erdên welêt bi mêrasî bidin mala Îsraêlê.

2 Li rasteka menan binêrin.

3 Li rasteka menan binêrin.

gotina Xudan, XUDAN. 10 Bila
tereziya we rast û efaya[2] we rast
û batiya[3] we rast bin! 11 Bona di
batê de ji dehan yek û bila di efa-
yê de ji dehan yekê homerê[1] be,
dê efa û bat di weznekê de bin; dê
wezna wê li gor homerê bin. 12 Û
dê şekel[2] bîst gera[3] bin; minaya[4]
we bîst şekel, bîst û pênc şekel û
panzdeh şekel bin.
13 Pêşkêşiya ku hûn ê pêşkêş
bikin ev e: Ji homerek genimî ji
şeş parî pariyekî û ji homerek cehî
hûn ê ji şeş pariyên efayê pariyekî
bidin 14 û ya rûn, zagona batekî
rûn, homerek, yanê ji qorê ku deh
bat e, ji deh pariyên batê pari-
yekî, ji ber ku deh bat pariyek e.
15 Û ji çêregehên qenc û avî yên
Îsraêlê, ji keriyê, ji du sed hebî
berxikek; ji bo ji wan re wekî bibe
kefaret pêşkêşiya nan û pêşkêşiya
şewitandinê û pêşkêşiyên xweşiyê
ne, gotina Xudan, XUDAN. 16 Dê
hemû neteweya welêt vê pêşkêşiyê
li Îsraêlê bidin beg. 17 Û di cejnan
de û di seriyê mehan de û di Seb-
tan de, di hemû cejnên eşkere yên
mala Îsraêlê de, dayîna pêşkêşiyên
şewitandinê û pêşkêşiyên nan û
pêşkêşiyên rijandinê dê karê beg
be; wekî bona ji mala Îsraêlê re
kefaretê bike, yê ku dê pêşkêşiya
sûc û pêşkêşiya nan û pêşkêşiya
şewitandinê û pêşkêşiyên xweşiyê
amade bike ew e.
18 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Di meha yekemîn de, di roja
yekemîn ya mehê de, tuyê ganêrekî
ciwan û bêqisûr rahêle û tuyê pe-
restgehê paqij bike. 19 Û dê kahîn
ji xwîna pêşkêşiya sûcê rahêle û bi
ser mircaqên xanî ve û bi çar qo-
zîkên qeraxa pêşkêşîgehê ve û bi
ser mircaqên deriyên hewşa hundir
ve bide. 20 Û bona her zilamê ku
çewtî û çavzîqî dike, tuyê di roja
heftemîn ya mehê de wusa bike û
hûn ê bona xanî kefaretê bikin.
21 Di meha yekemîn de, di ro-
ja çardeh ya mehê de bona we
dê Fisih, cejna heft rojî be; dê
nanê bêhavên bête xwarin. 22 Û
wê rojê beg, dê bona xwe û
bona hemû netewa welêt wekî
pêşkêşiya sûcê be ganêrekî ama-
de bike. 23 Û di heft rojên cejnê
de, wekî ku ji XUDAN re bibe
pêşkêşiya şewitandinê, dê her roj
heft ganêr û heft beranên bêqisûr
û wekî pêşkêşiya sûcê be her roj
nêriyekî amade bike. 24 Û wekî
pêşkêşiya nan be, bona gayekî
efayek û bona beranekî efayek û
bona efayekê jî hînekê rûn amade
bike. 25 Di meha heftemîn de, di
roja panzdehê mehê de, di cejnê
de, li gor pêşkêşiya sûcê, li gor

---

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Li rasteka menan binêrin.
4 Li rasteka menan binêrin.

pêşkêşiya şewitandinê û li gor
pêşkêşiya nan û li gor rûn, dê heft
rojî wusa bike.

*Para ku dê ji Serok re bikeve*

46 Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Dê deriyê hewşa
hundir yê ku li rojhilatê dinêre şeş
rojên kar girtî bimîne û dê roja
Sebtê bête vekirin. 2 Û dê beg ji
derve, ji rêya eywanê ve bikeve
hundir û dê li ber mircaqa derî
bisekine û dê kahînan pêşkêşiya
wî ya şewitandinê û pêşkêşiyên
wî yên xweşiyê amade bikin û
dê di şêmûga derî de peristinê
bike û derkeve derve; lê belê dê
derî heta êvarî neyê girtin. 3 Û
dê netewa welêt rojên Sebtê û
di seriyên mehan de, di cîhê ke-
tina vî deriyî de, li ber XUDAN
peristinê bikin. 4 Û roja Sebtê
pêşkêşiya şewitandinê ya ku dê
beg ji XUDAN re pêşkêş bike,
dê şeş berxik û beranekî bêqisûr
bin 5 û bona beran pêşkêşiya nan
efayek û bona berxikan pêşkêşiya
nan heta ku ji dest ve bê, dê bona
efayekê jî hînek rûn be.
6 Û dê roja serê mehê, ganêrekî
bêqisûr û ciwan û şeş berxik û
beranek be; dê bêqisûr bin 7 û
bona ganêr pêşkêşiya nan efayek
û bona beran efayek û bona ber-
xikan heta ku ji dest ve bê, bona
efayekê jî hînek rûn dê amade
bike. 8 Û dema beg bikeve hun-
dir, dê ji rêya eywanê ve bikeve û
dê ji rêya wê ve derkeve.
9 Û netewa welêt, dema di cejnên
eşkere de werin ber XUDAN, yê
ku bona peristinê ji deriyê bakur
ve bikevê, dê ji deriyê başûr ve
venegere û yê ji deriyê başûr ve
bikevê, dê ji deriyê bakur ve der-
keve; dê ji rêya deriyê ku ketiyê
ve dernekeve, tenê dê tam ji hem-
berê wê ve derkeve. 10 Û beg,
dema bikevinê dê ji nav wan ve
bikeve û dema derkevin dê pev
re derkevin. 11 Û di cejnan de
û di rojên eşkere de bona ganêr
pêşkêşiya nan efayek û bona be-
ran efayek û bona berxikan heta
ku ji dest ve bê, dê bona efayekê
jî hînek rûn be. 12 Û dema beg
wekî pêşkêşiya ji dil, pêşkêşiya
şewitandinê an jî pêşkêşiyên
xweşiyê bin ji XUDAN re
pêşkêşiya ji dil amade bike, dê
deriyê ku li rojhilatê dinêre jê re
bête vekirin û dê pêşkêşiya xwe
yî şewitandinê û pêşkêşiyên xwe
yî xweşiyê, mîna ku roja Sebtê
bike amade bikin û dê derkeve
derve û paşî ku ew derkeve derve
dê derî bête girtin.
13 Û tuyê bona ku ji XUDAN re
bibe pêşkêşiya şewitandinê, her
roj berxikekî yek salî amade bike;
tuyê her sibeh wê amade bike. 14
Û tevî vêya tuyê her sibe ji şeş
pariyên efayê pariyekî û bona ku
rûnê zirav şil bike wekî ji sê pari-

yê hînê pariyekî rûn be, pêşkêşiya
nan amade bike; bi zagona abadîn
ji XUDAN re pêşkêşiya nan ya
her timî ye. 15 Wekî pêşkêşiya
şewitandinê ya her timî bin, dê
berxikê û pêşkêşiya nan û rûnê
her sibê bi vî awayî amade bikin.
16 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Ger beg xelatê ji lawên xwe yekî
re bide, mêrasa wî bi xwe ye, dê
bibe yê lawên wî; bi rêya mêrasê
milkên wan e. 17 Lê belê ger ji
mêrasa xwe ji nav qûlên xwe ji
qûlekî xwe re xelatekî bidê, heta
sala rûsipîtiyê dê yê wî be; wê
gavê dê vegere beg; lê belê dema
were mêrasa wî, dê bibe yê lawên
wî. 18 Û beg, bona ku netewê ji
milkên wan ve biqewirîne dê ji
mêrasa wan ranehêle; netewa
min, bona ku her kes ji milkê xwe
ve belav nebe, dê ji milkê xwe
mêrasê bide lawên xwe.
19 Û ji cîhê ketinê ya li cem derî ye
min anî odeyên pîroz yên kahînan
ên ku li bakur dinêrin û a vay, li
wir, li şûna paşîn berbi rojavayê
cîhek hebû. 20 Û ji min re got:
Cîhê ku kahînan qurbanên gu-
nehê û qurbanên sûcê bikelînin û
pêşkêşiya nan çêbikin ev e; da ku,
bona netewê pîroz nekin bila wan
dernexînin hewşa derve. 21 Û min
derxist hewşa derve û ji çar qo-
zîkên hewşê ve min derbas kir û a
vay, li her quncika hewşê hewşek
hebû. 22 Li çar qozîkê hewşê,
hewşên girtî yên dirêjiya wan çel
gez û firehiya wan sih gez in he-
bûn; li qozîkan pîvana her çarî jî
yek bû. 23 Û li hawirdora wan, li
dor her çarî jî dîwar hebûn û li çar
hawirdor, cîhên kelandinê ḫatibûn
çêkirin. 24 Û ji min re got: Vana
xaniyên kelandinê ne, dê xizmet-
karên malê qurbana netewê li vê
derê bikelînin.

*Çemê ku ji Perestgehê diherike*

Yow 3,18; Zek 14,8; Pey 22,1-2

47 Û dîsa min anî deriyê xanî û
a vay, ber ve rojhilatê ji bin
şêmûga derî av derdiketin; ji ber ku
berê xanî li rojhilatê bû û av ji ali-
yê rastê xanî ji başûra pêşkêşîgehê,
ji jêr ve dadiketin. 2 Û min ji rêya
deriyê bakur ve derxist û ji rêya ku
derve, ji rêya deriyê ku li rojhilatê
dinêre ve, min heta deriyê derve
gerand û a vay, av ji aliyê rastê ve
diherikî!
3 Dema zilamê ku di destê wî de
tayê pîvanê hebû, berbi rojhilatê
ve derket hezar gezî pîva û min ji
avan ve derbas kir, avên ku der-
diketin pahniyan. 4 Hezarê din
pîvand û min ji avan ve derbas kir
avên ku hildikişiyan çongan. He-
zarê din pîvand û min ji avan ve
derbas kir, avên ku hildikişiyan
piştê. 5 Hezarê din pîva, bû çe-
mekî ku nikarîbûm tê de derbas
bibim, ji ber ku av bilind bûbûn,
avên ku mirov dikarîbûn tê de

ajnê bikin, çemekî ku nayê derbas
kirin.
6 Û ji min re got: Ma te ev dît, lawê
mirov? Wê gavê min meşand û dîsa
anî rexa çem. 7 Û gava vegeriyam,
a vay, ji vî alî û ji wî alî li rexa çem
gellek dar hebûn. 8 Û ji min re got:
Ev avan berbi aliyê rojhilatê derdi-
kevin û dê dakevin Arabayê[1] û dê
berbi behrê ve biçin; van avên ku
hatine derketin dê birijin hundirê
behrê û dê avên behrê qenc bibin.
9 Û dê wusa bibe ku, hemû afirên
bi can yên ku li her derê ku çem bi-
gihêje dikelijin, dê bijîn û dê gellekî
masî hebin; ji ber ku dema ev avan
bigihêjin wir dê avên behrê qenc bi-
bin û dê her tiştên ku li cîhê çem bi-
gihêje ne, bijîn. 10 Û dê wusa bibe
ku, masîvan li cem wê bisekinin;
cîhê ku ji En-Gedî heta En-Eg-
laîmê ye dê bibe şûna tor reşandinê;
mîna masiyên behra mezin dê li gor
cûreyên wan masiyên wê gellekî
bin. 11 Lê belê cîhên wê yî bi herî û
teqînên wê qenc nebin; dê ji xwêyê
re bên berdan. 12 Û li cem çem, li
qeraxa wê, dê li vî alî û li wî alî da-
rên fêkiyên bi her cûreyî bigihêjin,
dê pelê wê neçilmise û mêwên wê
neqede; dê her meh mêwa nû bide,
ji ber ku avên wê ji perestgehê ve
derdikevin û dê mêwa wê bibe fêkî
û pelê wê bibe îlac.

*Sînorên Welat*

1.Mûs 15,18-21; 4.Mûs 34,1-12; Îşa
26,15

13 Xudan, XUDAN wusa dibêje:
Sînora ku hûn ê welêt bi mêrasî
ji donzdeh ezbetên Îsraêlê ve par
bikin dê ev be; dê para Ûsiv dudu
be. 14 Û dê her kes bona birayê
xwe wê bi mêrasî bistînin; ji ber
ku ji bapîrên we re bona dayîna
wê sondê dam û dê ev welat bi
mêrasî ji we re bikeve.
15 Û dê sînorê welêt ev be: Aliyê
bakur ji behra mezin, heta rêya ku
ji Hetlonê diçe Tsedayê[2]; 16 Sîbraî-
ma ku di navbera sînorê Hamat,
Berota û Şamê û sînorê Hamatê de
ye; Hatser-Hattîkonê li cem sînorê
Havranê ye. 17 Û Hatsar-Enona li
sînorê Şamê ye, dê ji behrê ve bibe
sînor û li bakur, ber bi bakur sînorê
Hamatê. Aliyê bakur ev e. 18 Û
aliyê rojhilatê, dê di nav Havran û
Şam û Gîlead û warê Îsraêlê de Ur-
dun be û hûn ê ji sînorê bakur heta
behra rojhilatê bipîvin. Aliyê roj-
hilatê ev e. 19 Û aliyê başûr, berbi
başûr ji Tamarê, heta avên Merî-
bot-Kadeşê, heta newala Misirê,
heta behra mezin. Aliyê başûr, ber-
bi başûrê ev e. 20 Û ji aliyê başûr
heta hemberî cîhê ketina Hamatê,
dê aliyê rojavayê behra mezin be.
Aliyê rojavayê ev e.

---

1 Newala kûr ya li başûr û bakûrê behra Lût e.

2 An jî: Heta cîhê ku diçe nav Tsedayê.

21 Bi vî awayî hûn ê vî welatî
li gor xwe, li gor ezbetên Îsraêlê
par bikin. 22 Û dê wusa bibe ku,
hûn ê wê ji xwe re û ji xerîbên ku
di nav we de mêvan in û di nav
we de bûne bavên zarokan re, bi
pişkê ve par bikin û dê ew ê di
nav lawên Îsraêl de bona we bibin
mîna yên ji dimatî ne; dê di nav ez-
betên Îsraêlê de bi we re mêrasên
wan hebin. 23 Û dê wusa bibe ku,
ew xerîb di kîjan ezbetê de mêvan
be, hûn ê mêrasa wî li wir bidinê,
gotina Xudan, XUDAN.

*Parvekirina Welat*
Yêşû 14-19

48 Û navên ezbetan ev in: Ji
seriyê bakur, li cem rêya
Hetlonê, heta cîhê ketina Hamatê,
li sînorê Şamê heta Hatsar-Enanê,
berbi bakur li cem Hamatê ye,
parek û dê aliyê rojhilat û roj-
avayê bibin yê Dan. 2 Û li cem
sînorê Danê, ji aliyê rojhilatê heta
rojavayê, Aşer, parek. 3 Û li cem
sînorê Aşerê, ji aliyê rojhilatê heta
aliyê rojavayê, Naftalî, parek.
4 Û li cem sînorê Naftaliyê, ji ali-
yê rojhilatê heta aliyê rojavayê,
Manaşşe, parek. 5 Û li cem sînorê
Manaşşe, ji aliyê rojhilatê heta
aliyê rojavayê, Efrayîm, parek.
6 Û li cem sînorê Efrayîm, ji ali-
yê rojhilatê heta aliyê rojavayê,
Rûben, parek. 7 Û li cem sînorê
Rûbenê, ji aliyê rojhilatê heta ali-
yê rojavayê, Cihûda, parek.
8 Û pêşkêşiya ku hûn ê pêşkêş
bikin, ji aliyê rojhilatê heta aliyê
rojavayê, dê li cem sînorê Cihû-
dayê be, firehiya wê bîst û pênc
hezar (gez) û dirêjiya wê ji aliyê
rojhilatê heta aliyê rojavayê, dê
li gor yekî ji paran be û dê pe-
restgeh di navenda wê de be.
9 Dê dirêjiya pêşkêşiya ku hûn ê
ji XUDAN re pêşkêş bikin, bîst û
pênc hezar (gez) û firehiya wê deh
hezar (gez) be. 10 Û dê pêşkêşiya
pîroz bona wan be, bona kahîn-
an; berbi bakur dirêjiya wê bîst
û pênc hezar (gez) û berbi roja-
vayê firehiya wê deh hezar (gez)
û berbi rojhilatê firehiya wê deh
hezar (gez) û berbi başûr dirêjiya
wê bîst û pênc hezar (gez) û dê
Perestgeha XUDAN di navenda
wê de be. 11 Dê bona kahînên ku
ji lawên Tsadok ve hatine pîroz
kirin be, ewên ku bi notirvaniya
min ve girtin, gava lawên Îsraêl
ji rê derketin mîna ku Lêwiyiyan
ji rê derketibûn, ew ji rê derne-
ketin. 12 Û li cem sînorê Lêwi-
yiyan, dê ji pêşkêşiya welêt bona
wan pêşkêşiyek bibe, dê zehf
pîroz be.
13 Û hevrastê sînora kahînan bîst
û pênc hezar (gez) dirêjî û deh he-
zar (gez) firehî dê ya Lêwiyiyan
be; hemû dirêjî bîst û pênc hezar
(gez) û firehî deh hezar (gez).
14 Û dê ji wê nefiroşin û negu-

herin û dê nûberê erdê derbasî
kesekî din nebe; ji ber ku ji XU-
DAN re pîroz e.
15 Û li ber bîst û pênc hezar gezî,
pênc hezar gezê ku ji ber firehiyê
maye, wekî bibe cîhê rûniştinê û
cîhê vekirî be dê bona bajêr bibe
malê gel û dê bajar di navenda wê
de be. 16 Û dê pîvanên wê wusa
bin: Aliyê bakur çar hezar û pênc
sed gez, aliyê başûr çar hezar û
pênc sed gez û ji aliyê rojhilatê ve
çar hezar û pênc sed gez û aliyê
rojavayê çar hezar û pênc sed gez.
17 Û dê cîhên vekirî yên bajêr he-
bin; ber ve bakur du sed û pêncî
gez û ber ve başûr du sed û pên-
cî gez û ber ve rojhilatê, du sed
û pêncî gez û ber ve rojavayê du
sed û pêncî gez. 18 Û wekî hev-
rastê pêşkêşiya pîroz be, yê ku ji
ber firehiyê maye, berbi rojhilatê
deh hezar gez û berbi rojavayê
deh hezar gez û dê bibe hevrastê
pêşkêşiya pîroz û dê zadên[1] wê ji
yên ku karên bajêr dikin re bibe
xwarin. 19 Û ji hemû ezbetên Îs-
raêlê yên ku karên bajêr dikin, dê
wê zeviyê bajon û biçînin. 20 Dê
hemû pêşkêşî bîst û pênc hezar
gez û bîst û pênc hezar gez bin;
hûn ê pêşkêşiyê pîroz tevî milkê
bajêr wekî çar alî yek bin pîroz
bikin.
21 Û tevî milkê bajêr yê ku ji vî
alî û ji wî aliyê pêşkêşiya pîroz
ve bimîne, dê ji beg re be; berbi
sînorê rojhilatê li ber bîst û pênc
hezar gez pêşkêşiyê û li cem
sînorê rojavayê, berbi rojavayê
li ber bîst û pênc hezar gezê wê,
cîhê ku hevrastê para ne dê ji beg
re be û dê pêşkêşiya pîroz û pe-
restgeha malê di navenda wê de
bin. 22 Û di navbera sînorê Cihû-
dayê û sînorê Benyamînê de xey-
nî milkê Lêwiyiyan û milkê bajêr
yê ku di navenda ya aidî beg e, yê
din ji beg re be.
23 Û dema em werin ezbetên ku
li şunda mayîne; ji aliyê rojhilatê
heta aliyê rojavayê Benyamîn,
parek. 24 Û li cem sînorê Ben-
yamîn, ji aliyê rojhilatê heta
aliyê rojavayê, Şîmeûn, parek.
25 Û li cem sînorê Şîmeûn, ji ali-
yê rojhilatê heta aliyê rojavayê,
Îsşakar, parek. 26 Û li cem sînorê
Îsşakar, ji aliyê rojhilatê heta
aliyê rojavayê, Zebûlûn, parek.
27 Û li cem sînorê Zebûlûn, ji ali-
yê rojhilatê heta aliyê rojavayê,
Gad, parek. 28 Û li cem sînorê
Gadê, li aliyê başûr, berbi başûr,
dê sînor ji Tamarê heta avên Merî-
bat-Kadeşê, heta newala Misirê,
heta behra mezin bibe. 29 Bona
ku bibe mêras, welatê ku hûn ê bi
pişkê ji ezbetên Îsraêlê re belav
bikin ev e û parên wan vana ne,
gotina Xudan, XUDAN.

1 Dexl, ber, mehsûl.

*Deriyên Orşelîmê*

30 Û cîhên derketina bajêr ev in:
Li aliyê bakur bi pîvanê çar hezar
û pênc sed gez. 31 Û dê deriyên
bajêr li gor navên ezbetê Îsraêlê
bin, berbi bakur sê derî: Deriyê
Rûben, yek; deriyê Cihûda, yek;
deriyê Lêwî, yek. 32 Û li aliyê
rojhilatê çar hezar û pênc sed gez
û sê derî: Deriyê Ûsiv, yek; deri-
yê Benyamîn, yek; deriyê Dan,
yek. 33 Û li aliyê başûr çar hezar
û pênc sed gez û sê derî: Deriyê
Şîmeûn, yek; deriyê Îssakar, yek;
deriyê Zebûlûn, yek. 34 Û li aliyê
rojavayê çar hezar û pênc sed gez
û sê deriyên wan; deriyê Gadê,
yek; deriyê Aşer, yek; deriyê
Naftalî, yek. 35 Dê li çar hawir-
dorê hîjdeh hezar gez bin û dê ji
wê rojê ve navê bajêr: XUDAN li
wir e[1] be!

[1] Bi Îbranîtî, Yahvê - Şamma ye.

# DANÎÊL

*Pêşgotin*

Du nuxtikên bingehîn yê Pirtûka Danîêl hene:

1. Danîêl û sê hevalên wî yên ku ji aliyê Nebûkadnetsarê qiralê Babîlê ve hatine sirgûn kirina xwe û li dijî zordestiyê mezin ji Xwedê re dilsoz mayîna wan pirtûk tîne ziman. Bi saya bawerî û dilsoziya xwe yî ji Xwedê re, ji neyarên xwe seretatir bûn. Ev bûyerna him di dema qiraletiya Babîlê de û him jî di ya Farsê de derbas bûne.
2. Xewn û xeyalên ji aliyê Danîêl ve hatine dîtin: Di van xewn û xeyalan de tête daxuyanî kirin ku ji Babîlê dest pê bike dê gellek qiraletî bilind bin û bikevin û qiralê zordest ê ku li dijî Xwedê radibe dê têk biçe û gelê Xwedê dê bigihêje serfiraziyê.

Ya dawîn pirtûk dide şanîkirin ku Xwedê serwerên Qiralên dinyewî ye.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-6:28 | Danîêl û hevalên wî |
| 7:1-12:13 | Xewn û xeyalên Danîêl |
| a. 7:1-28 | Çar Afir |
| b. 8:1-9:27 | Beran û nêrî |
| c. 10:1-11:45 | Nûçegîhanê ezmanî |
| ç. 12:1-13 | Dawiya demê |

*Danîêl li Babîlê tête perwerde kirin*

1 Di sê saliya qiraletiya Yehoya-
kîmê qiralê Cihûdayê de, Ne-
bûkadnetsarê qiralê Babîlê hate
Orşelîmê û dor û berên wê girt.
2 Û Xudan, Yehoyakîmê qiralê
Cihûdayê û hinekên ji taximên ku
li mala Xwedê ne da destê wî û wî
wan bir welatê Şînarê, mala îlahê
xwe û taximan bir mala xezîneya
îlahê xwe. 3 Û ji lawên Îsraêl, ji
nîjada qiral û ji zadeganan, 4 bona
xortên ku di wan de tu qisûr nîne
û xuyabûna wan xweşik in û di

her zanyariyê de bi fêhmkarî û za-
niyar û yên ku ji fenê fêhm dikin
û yên ku liyaq in ku di qesra qiral
de bimînin bila bînin û nivîs û zi-
manê Kildaniyan hînî wan bikin,
qiral ji serokê axayên haremiyê
Aşkenaz re got. 5 Û bona sê sal
wan xwedî bikin û paşî wê bona
ku li ber qiral bisekinin, ji xwa-
rinên xweşik yên qiral û ji xemra
ku ew vedixwe, qiral her roj ji wan
re rojaneyê tayîn kir. 6 Û di nav
wan de ji lawên Cihûda Danîêl,
Hananya, Mîşaêl û Azarya he-
bûn. 7 Û serokê karmendên qesrê
nav li wan kir; navê Belteşatsar li
Danîêl û navê Şadrak li Hananya
û navê Meşak li Mîşaêl û navê
Abed-Nego li Azarya kir.
8 Lê belê Danîêl xist dilê xwe ku,
bona bi xwarinên qiral ên xweş û
bi xemra ku vedixwe xwe mindar
neke û bona ku xwe mindar neke,
li ber serokê karmendên qesrê ve
geriya. 9 Û li ber serokê karmen-
dên qesrê Xwedê Danîêl gîhand
saye û dilovaniyê. 10 Û serokê
karmendên qesrê ji Danîêl re
got: Ez ji efendiyê xwe qiral, yê
ku xwarin û vexwarina we tayîn
kiriye ditirsim; ma çima dê wecê
we ji xortên ku di temena we de
ne xerabtir bibîne? Bi vî awayî
hûn li cem qiral serê min dixin
xeterê[1]! 11 Û Danîêl ji keyayê ku
serokê karmendên qesrê daniye
ser Danîêl, Hananya, Mîşaêl û
Azarya re got: 12 Ez rica dikim,
deh rojî van qûlên xwe biceribîne
û bila bona xwarinê sewze û bona
vexwarinê avê bidine me. 13 Wê
gavê bila carekî li wecê me, ca-
rekî jî li wecê xortên ku xwarinên
xweş yên qiral dixwin ve binêrin
û li gor ku te dîtiye bi van qûlên
xwe re bike! 14 Û di vî tiştî de
gotina wan guhdarî kir û deh roj
wan ceriband. 15 Û paşî deh rojî
wecê vana ji wecê xortên ku xwa-
rinên xweş yên qiral dixwin zêde
xweşiktir hate xuya kirin û di goşt
de[2] jî hîn qelewtir bûn. 16 Û keya
xwarinên wanî xweş û xemra ku
dê vexwin rakir û sewze da wan.
17 Û dema em werin van her çar
xortan, di her tewrê pirtûk û zan-
yariyê de Xwedê zanîn û aqil da
wan û di hemû xewn û xeyalan
û xewnan de Danîêl bi fêhmkarî
bû. 18 Û paşî rojên ku bona hatina
wanî hundirê qiral gotiye, serokê
karmendên qesrê wan anîn hun-
dir, ber Nebûkadnetsar. 19 Û qiral
bi wan re axifî û di nava hemûyan
de mîna Danîêl, Hananya, Mîşaêl
û Azarya tune bûn û vana li ber
qiral sekinîn. 20 Û di nav hemû
zanyarî û fêhmkariya ku qiral ji
wan re pirsiye de, wan ji hemû
sêrbaz û remildarên ku li welêt

1 Talûkê.

2 An jî: Ji aliyê goşt ve.

in, deh qat seretatir dîtin. 21 Û Danîêl heta yeksaliya qiral Koreş li cîhê xwe ma.

*Xewna ku Nebûkadnetsar dîtiye*

2 Û di du saliya qiraletiya Nebûkadnetsar de, Nebûkadnetsar xewnan dît û ruhê wî aciz bû û xew li wî reviya. 2 Û bona ku xewnên wî ji qiral re bibêjin, qiral emir da ku, bila bangî sêrbazan, remildaran û afsûnkaran û Kildaniyan bikin. Ew jî ketin hundir û li ber qiral sekinîn. 3 Û qiral ji wan re got: Xewnek dîtim û bona ku wê xewnê fêhm bikim ruhê min aciz dibe. 4 Û Kildaniyan bi zimanê Aramî ve ji qiral re gotin: Ya qiral, abadîn bijî! Vê xewna xwe ji van qûlên xwe re bibêje ku em şirova wê ji te re bikin! 5 Qiral bersivê da û ji Kildaniyan re got: Ew tişt ji hişê min ve derket; ger hûn xewnê û şirova wê ji min re nebêjin, hûn ê bên perçe perçe kirin û dê xaniyên we bibin zibilxane! 6 Lê belê ger hûn xewnê û şirova wê bibêjin, hûn ê ji min diyariyan û tevî xelatan birêziya mezin bistînin; bo vê yekê xewnê û şirova wê nîşanî min bidin! 7 Wan dîsa bersivê dan û gotin: Bila qiral ji van qûlên xwe re xewnê bibêje ku, em şirova wê jê re bikin! 8 Qiral bersivê da û got: Bi rastî ez dizanim ku hûn dixwazin wextê qezenc bikin, ji ber hûn dibînin ku ew tişt ji hişê min ve çûye. 9 Lê belê ger hûn xewnê ji min re nebêjin, bona we tenê daraziyek heye; ji ber heta ku wext buguherin we, bona ku li ber min bibêjin derewan û gotinên çewt rêz kirin; bo vê yekê, hûn xewnê ji min re bibêjin, ez jî fêhm bikim ku hûn ê bikaribin şirova wê bikin! 10 Li ber qiral, Kildaniyan bersivê dan û gotin: Li rûyê erdê tu mirov nîne ku vî tiştê nîşanî qiral bide; ji ber ku qet qiralek, efendiyek an jî serwerek, ji sêrbazekî, remildarekî an jî ji Kildaniyekî tiştekî wusa nepirsî ye. 11 Û tiştê ku qiral pirsiyaye bi zehmet e û xeynî îlahên ku şunwarên wan ne di nav mirovan de ne, tu kes nîne ku vêya li pêş qiral bide nîşan kirin. 12 Ji ber vê yekê qiral hêrs bû û zehf hate xezebê û bona hemû zilamên bi zanyar yên Babîlê tune bikin, emir da. 13 Û ferman derket û dê zilamên bi zanyar bihatana kuştin û bona bukujin li Danîêl û hevalên wî ve geriyan.

14 Wê gavê Danîêl bi zanyar û zîrekî bersivê da Aryokê serokê leşkerên parêzger yê qiral, ê ku bona kuştina zilamên bi zanyar yên Babîlê derketiye; 15 bersivê da Aryokê serokê qiral û got: Ma çima ji aliyê qiral ve ferman wusa awarte[1] ye? Wê çaxê Aryok rewşê ji Danîêl re got. 16 Û Danîêl ket

[1] An jî: Tund e.

hundir û bona ku şirovê ji qiral
re bike wextê bide wî, li ber qiral
geriya.
17 Li ser vê yekê Danîêl çû mala
xwe û kar ji hevalên xwe Hananya,
Mîşaêl û Azarya re got; 18 da ku,
bila ji ber vê razê ji Xwedayê ez-
manan ve rehmê bixwazin ku, bila
Danîêl û hevalên wî tevî zilamên
bi zanyar yên Babîlê ên ku ji ber
mayîne neyên tune kirin. 19 Wê
gavê ev raz di xewn û xeyala şevê
de ji Danîêl re hate vekirin. Li ser
vê yekê Danîêl Xwedayê ezmanan
pîroz kir. 20 Danîêl bersivê da û
got: Bila navê Xwedê ji bêpêşîbûnê
heta abadînê pîroz be; ji ber ku
zanyarî û zordestiya ku di ser her
tiştî de ye, ya wî ye. 21 Û yê ku wext
û deman diguhere ew e; qiralan
radike û qiralan datîne; zanyariyê
dide yên bi zanyar û zanînê dide
fêhmkaran; 22 tiştê kûr û veşartî
ew vedike; di hundirê tariyê de çi
heye pê dizane û ronahî li cem wî
cîh girtiye. 23 Ya Xwedayê bapîrên
min, te ku, zanyarî û qudretê da
min û tiştên ku me ji te xwestine
niha te ji min re gîhand, ez ji te re
şikirî û hemdê dikim, ji ber ku te
karê qiral ji me re gîhand.

*Danîêl xewnê şirove dike*

24 Li ser vê yekê Danîêl, ket cem
Aryokê ku qiral wî bona tune ki-
rina zilamên bi zanyar yên Babîlê
daniye; çû û jê re wusa got: Zi-
lamên bi zanyar yên Babîlê tune
neke; min bibe ber qiral ku ez
şirovê ji qiral re bikim[1]!
25 Wê gavê Aryok hema Danîêl
bir hundir, ber qiral û jê re wusa
got: Ji sirgûnên Cihûdayê ve zila-
mekî ku dê şirovê ji qiral re bike
dîtim. 26 Qiral bersivê da Danîêlê
ku navê wî Belteşatsar e û jê re
got: Ma tu dikarî xewna ku dîti-
me û şirova wê ji min re bibêjî?
27 Danîêl li ber qiral bersivê da û
got: Zilamên bi zanyar, remildar û
sêrbaz nikarin raza ku qiral pirsi-
ye nîşanî qiral bidin; 28 lê belê li
ezmanan Xwedayek ku razan ve-
dike heye û ka dê di rojên dawîn
de çi bibin, wî ji qiral Nebûkad-
netsar re gîhandiye. Xewna te,
li ser livînên te xewn û xeyalên
seriyê te ev in: 29 Tu, ya qiral,
bi gotina: Ka dê ji niha pê ve çi
bibe li ser livînên te fikr ji te re
hatin[2] û yê ku razan vedike, ka dê
çi bibe ji te re gîhand. 30 Û dema
em werin rewşa min, ne ji ber ji
hemûyên ku dijîn zêdetir zanyarî
di min de ye, lê bona ku şirove ji
qiral re bête kirin ku, tu fikra dilê
xwe fêhm bike, ev raz ji min re
hate vekirin.
31 Tu, ya qiral, te dît û a vay, pey-
kerek mezin. Ev peykerê ku me-

---

[1] An jî: Ez şirovê nîşanî qiral bidim.

[2] An jî: Fikr ketin hiş û ramanên te.

zin e û zehf dibiriqe li ber te di-
sekinîbû û xuyabûna wê tirsehêz
bû. 32 Ev peykera, serê wê ji zêrê
xas, sîng û milên wê ji zîvê, zik
û kemaxên wê ji tûncê, 33 şeqên
wê ji hesin, lingên wê qismek
ji hesin û qismek ji ritamê bûn.
34 Tu di nêrîne de bû, heta wê
wexta ku kevirekî bêyî dest dayînê
ji cîhê xwe ve qut bû[1]; ew kevir ji
lingên wê yî ji hesin û ritamê ye
li peykerê xist û wan perçe perçe
kir. 35 Wê gavê hesin, ritam, tûnc,
zîv û zêr pev re perçe bûn û bûn
mîna hûrikê kayê bêndera havînê
û ba wan rakir û bona wan cîhekî
nehat dîtin û kevirê ku li peykerê
xistiye bû çiyake mezin û hemûya
dinê dagirt.
36 Xewn ev e û em ê li ber qiral
şirova wê bibêjin. 37 Ya qiral, qi-
ralê qiralan, tu ku, Xwedayê ez-
manan qiraletiyê, quwetê û me-
zintiyê daye te 38 û li her cîhên
ku lawên mirovan lê rûdininê,
heywanên beyarê û civîkên ez-
manan daye destên te û li ser
hemûyan te kiriye serwer; seriyê
ku ji zêr e tu yî. 39 Û dê paşî te, ji
te kêmtir qiraletiyekî din derkeve
û xeynî tûnca ku dê li ser hemûya
dinê serweriyê bajo, qiraletiyekî
dinî sêwemîn derkeve. 40 Û dê
qiraletiya çaremîn mîna hesin
xwurt be, ji ber ku hesin her tiştî
perçe dike û dişikîne û mîna he-
sinê ku hemûyên wan dieciqîne
dê biperçiqîne û bieciqîne. 41 Û
madem ku te qismekî ling û tilî-
kan ji heriya pîrot e û qismekî ji
hesin e dît, dê qiraletiyek parbûyî
be; lê belê dê di wê de hêza he-
sin hebe, ji ber ku te hesin tevî
heriya ritamê dît. 42 Û çawa ku
qismekî tilîkên lingên wê ji hesin
û qismekî ji ritamê ne, dê qis-
mekî qiraletiyê xwurt û qismekî
wê bêhêz bin. 43 Û madem ku te
hesin tevî heriya ritamê dît, dê bi
nîjada mirov re tevlî hev bibin;
lê belê çawa ku hesin û ritam
tevî hev nabin, dê ew jî bi hev
re nezeliqin. 44 Û di rojên wan
qiralan de dê Xwedayê ezmanan
qiraletiyekî ku abadîn xerab nabe
damerizîne û dê serweriya wê ji
neteweyekî din re neyê berdan;
tenê ew ê hemûya van qiraletiyan
perçe bike û dê wan biqedîne û dê
ew ê abadîn bimîne. 45 Û madem
te dît ku bêyî dest lêkeve ji çiyê
kevirek qut bû[2] û hesin û tûnc û
ritam û zîv û zêrê perçiqandin; ka
dê li pêy vê yekê çi bibe, Xwedê
ji qiral re gîhandiye û ev xewn
rasteqîn û şirova wê rast e.
46 Wê gavê qiral Nebûkadnet-
sar bi ser wecê xwe ve ket û ji
Danîêl re secde kir û bona pêşkêşî
û bêhnên xweş pêşkêşî wî bikin

*1* Hate birîn, jê kirin, an jî: Rabû, bilind bû.

*2* Hate birîn.

emir da. 47 Qiral bersivê da Danîêl û got: Madem ku te hêz anî û vê razê vekir[1], bi rastî Xwedayê we, Xwedayê îlahan û Xudanê qiralan e û yê ku razan vedike ew e! 48 Wê gavê qiral Danîêl mezin kir û gellekî diyariyên mezin da wî û wî li ser hemû welatê Babîlê kir serwer û li ser hemû zilamên bi zanyar yên Babîlê kir serokê yekem. 49 Û Danîêl ji qiral xwest û ew jî Şadraqê, Meşaqê û Abed-Negoyê danî ser karên welatê Babîlê; lê belê Danîêl di deriyê qiral de bû.

*Peykerê Zêrîn yê ku Nebûkadnetsar daniye*

Pey 13,14-15

3 Qiral Nebûkadnetsar peykerekî zêr çêkir, qama wê şêst gez[2] û firehiya wê şeş gez bû; li welatê Babîlê, di deşta Dûrayê de wê çikand[3]. 2 Û bona werin tirxana peykerê ku Nebûkadnetsar wê daniye, ji bo civandina satrapan, qeymiqayman û waliyan, dadgeran, xezînedaran, muftiyan, feqiyan û hemû karmendên bilind yên welatan, qiral Nebûkadnetsar şand. 3 Wê gavê bona tirxan kirina peykerê ku qiral Nebûkadnetsar wê çikandiye satrap, qeymiqaym û waliyan, dadgeran, xezînedaran, muftiyan, feqiyan û hemû karmendên bilind yên welatan civiyan û li ber peykerê ku Nebûkadnetsar wê çikandiye sekinîn. 4 Û bangewaz bi dengekî bilind bang kir: Ya neteweno, gelno û zimanno, ji we re tête emir kirin ku, 5 dema hûn dengê borî, zirne, çenk, ûd, ribab, hewan[4] û her tewrî dengê haletên muzîkê bibihîzin, divê hûn bi dev û rû xwe bavêjin erdê û ji peykerê zêr yê ku qiral Nebûkadnetsar wê daniye re peristinê bikin! 6 Û her kî ku xwe navêje erdê û peristinê jê re neke, hema di wê saetê de dê bête avêtinî hundirê firna ku agirê wê bi pêt e! 7 Li ser vê yekê wê gavê hemû neteweyan dema dengê borî, zirne, çenk, ûd, ribab û her tewrê haletên muzîkê bihîstin, hemû neteweyan, gelan û zimanan bi dev û rû xwe avêtin erdê û ji peykerê zêr yê ku qiral Nebûkadnetsar daniye re peristinê kirin.

*Hevalên Danîêl têne tawanbar kirin*

8 Li ser vêya wê gavê hinek Kildanî nêzîk hatin û giliyê Cihûdiyan kirin. 9 Bersivê dan qiral Nebûkadnetsar û gotin: Ya qiral, abadîn bijî! 10 Tu, ya qiral, te bi gotina: Her zilamê ku dengê borî, zirne, çenk, ûd, ribab, hewan û

---

1 An jî: Eşkere kir.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Danî.
4 Heban, gayda, cewar.

her tewrê haletên muzîkê bibihî-
zin, dê xwe bi dev û rû bavêjin
erdê û ji peykerê zêr re peristinê
bikin 11 û ger her kî ku xwe na-
vêje erdê û peristinê neke dê bête
avêtinî hundirê firna ku agirê wê
bi pêt e, fermanê da. 12 Lê hinek
Cihûdiyên ku te wan daniye ser
karê welatê Babîlê hene, Şadrak,
Meşak û Abed-Nego; van zila-
man, ya qiral, te nehesibandin;
ji îlahên te re qûlitiyê nakin û ji
peykerê zêr yê ku te daniye re pe-
ristinê nakin!
13 Wê gavê bona ku Şadrak,
Meşak û Abed-Nego bînin Ne-
bûkadnetsar bi hêrs û xeydê emir
da. Wê gavê van zilaman anîn ber
qiral. 14 Nebûkadnetsar axiftî û
ji wan re got: Ya Şadrak, Meşak
û Abed-Nego, ma bi zanînê hûn
qûlitiyê ji îlahê min re nakin û ji
peykerê zêr yê ku danîme re pe-
ristinê nakin? 15 Niha ger hûn bi
bihîstina dengê borî zirne, çenk,
ûd, ribab, hewan û her tewrê ha-
letên muzîkê, bona bi dev û rû
çûyîna erdê û ji peykerê ku çêki-
rime peristinê re amade bin, baş e
û ger hûn peristinê nekin, hema di
wê saetê de hûn ê bên avêtinî hun-
dirê firneya agirê wê bi pêt e û ma
îlahê ku we ji destê min xelas bike
kî ye? 16 Şadrak, Meşak û Abed-
Nego bersivê dan qiral û gotin:
Ya Nebûkadnetsar, li ser vê yekê
ji te re bersiv dayîn ji me re hewce
nake. 17 Ger wusa bibe Xwedayê
me, yê ku em jê re qûlitiyê dikin
dikare me ji firna ku agirê wê
bi pêt e û dê me ji destê te xelas
bike, ya qiral! 18 Ger nebe jî, bila
tu pê bizanibe ku[1], ya qiral, em ji
îlahên te re qûlitiyê nakin û em ji
peykerê zêr yê ku te daniye re pe-
ristinê nakin!

*Hevalên Danîêl davêjin Firnê*

19 Wê gavê Nebûkadnetsar bi
hêrs ve tijî bû û li dijî Şadrak,
Meşak û Abed-Nego ve şiklê
wecê wî hate guhertin; li ser vê
yekê bersivê da û çawa ku li ser
adetê firne tête sor kirin, bila heft
qatî zêdetir sor bikin emir da.
20 Û bona ku Şadrak, Meşak û
Abed-Nego girê bidin û wan ba-
vêjin firna bi agir, emir da hinek
egîdên dijwar yên ku di artêşa
xwe de ne. 21 Wê gavê van zila-
man, wekî şalwarên wan, şaşikên
wan, qeftanan û kincên wanî din
li ser wan bin hatin girêdan û ha-
tin avêtinî hundirê firna ku agirê
wê bi pêt e. 22 Li ser vê yekê,
bona ku emrê qiral pêt û firne
pirr sor e, pêta agir zilamên ku
Şadrak, Meşak û Abed-Nego ra-
girtine û dibin kuştin. 23 Û ev her
sê zilam, Şadrak, Meşak û Abed-
Nego bi girêdayî ketin hundirê
firna ku agirê wê bi pêt e.

1 An jî: Malûma te hebe ku.

24 Wê gavê qiral Nebûkadnetsar
şaş û metal bû û bi lezî rabû ser
pêlan; bi şîretkirên xwe re axifî û
ji wan re got: Ma me sê zilamên
girêdayî neavêtin hundirê agir?
Bersivê dan qiral û gotin: Rast
e, ya qiral! 25 Wî bersivê da û
got: A vay, ez çar kesên ku ha-
tine vekirin dibînim, di hundirê
agir de dimeşin û tu xesar li wan
nebûye; xuyabûna yê çaremîn
jî mîna lawekî îlahan e! 26 Wê
gavê Nebûkadnetsar nêzîkî devê
firna ku agirê wê bi pêt e bû; axifî
û got: Ya qûlên Xwedayê Bilind,
Şadrak, Meşak û Abed-Nego, der-
kevin derve û werin vir! Wê çaxê
Şadrak, Meşak û Abed-Nego ji
nav agir derketin. 27 Û satra-
pan, qeymiqayman û waliyan û
şîretkirên qiral wekî li cem hev
civiyayî van zilaman dîtin; li ser
bedenên wan qudreta agir tunebû
û porê serên wan neşewitîbûn û
rewşa şalwarên wan nehatibû gu-
hertin, bêhna agir jî daneketibû
ser wan.
28 Nebûkadnetsar axifî û got:
Bila Xwedayê Şadrak, Meşak
û Abed-Nego pîroz be, ew ku
milyaketê xwe şand û qûlên xwe
yên ku bi wî ewle bûn xelas kir
û ew ji gotina qiral wêdetir der-
bas bûn û bona ku ji Xwedayê
xwe cihêtir ji îlahekî din re qûli-
tiyê nekin û neperistin, bedena
xwe dan! 29 Û ez fermanê didim
ku, her netewe, gel û zimanê ku
li dijî Xwedayê Şadrak, Meşak û
Abed-Nego gotinê bibêje, dê bête
perçiqandin û dê xaniyên wan
bête zibilxane kirin; ji ber ku tu
îlahekî dinî wusa xelas bike nîne.
30 Wê gavê qiral, Şadrak, Meşak
û Abed-Nego li welatê Babîlê da
karên hîn jî bilindtir.

*Xewna Duwem ya Nebûkadnetsar*

4 Ji qiral Nebûkadnetsar ve bona
hemû netewe, gel û zimanên
li hemûya dinê ve rûdinin: Bila
xweşiya we pirr be! 2 Bang kirina
nîşan û nuwazeyên ku Xwedayê
Bilind bona min çêkiriye ji min re
qenc hate xuya kirin. 3 Nîşanên
wî çi mezin in! Û nuwazeyên wî
çi xwurt in! Qiraletiya wî qirale-
tiyekî abadîn e û serweriya wî ji
demê heta deman didome!
4 Ez Nebûkadnetsar, ez li mala
xwe rehet û di qesra xwe de di
hundirê firehiyê de bûm. 5 Xew-
nekî ku min tirsand dîtim û li ser
livînên min fikr û xewn û xey-
alên serê min, min kesirandin.
6 Û bona ku hemû zilamên bi
zanyar yên Babîlê bînin ber min
û bila şiroveya vê xewnê bighînin
min fermanê dam! 7 Û sêrbazan,
remildaran, Kildaniyan û efsûn-
keran ketin hundir û min li ber
wan xewnê got, lê belê şirovê
ji min re nekirin. 8 Lê belê ya
dawîn Danîêlê ku ruhê îlahên

pîroz tê de ye û li gor navê îlahê
min Belteşatsar e hate ber min
û xewnê ji wî re gotim: 9 Ya
Belteşatsar, serekê sêrbazan, ji ber
ez dizanim ku ruhê îlahê pîroz di
te de ye û tu raz dijwariyê ji te re
nakin, xewn û xeyala xewna min
û şirova wê ji min re bibêje! 10
Li ser livînên min xewn û xeyala
serê min ev bû: Nihêrtim û a vay,
li navenda dinê darek hebû û zehf
bilind bû. 11 Dar mezin bû û geş
bû û qama wê gîhaşt ezmanan û
heta nîçikê erdê dihat xuya kirin.
12 Pelên wê xweşik û fêkiyên[1] wê
zêde bûn û di wê de bona her kesî
xwarin hebû; heywanên beyarê
di bin wê de ketin sîhê û civîkên
ezmanan li guliyên wê daketin û
hemû mirov ji wê xwarin. 13 Li
ser livînên xwe di xewn û xeyalên
serê xwe de dîtim û a vay, milya-
ketek pîroz û parêzger ji ezmanan
ve daket. 14 Bi dengekî bilind
bang kir û wusa got: Dar jê bikin,
guliyên wê jêkin, pelên wê bilîçi-
kînin û fêkiyê wê bireşînin! Bila
heywan ji bin wê û civîk ji guli-
yên wê birevin! 15 Lê belê dalîtên
rehên wê bi hesin û tûncê bi toq
bikin û li erdê, di nav gîhayê teze
yê beyarê de bihêlin û bila bi xu-
nava beyarê ve şil bibe û bila tevî
heywanan di gîhayê erdê de para
wê hebe; 16 bila dilê wê yî mirov
bête guhertin û bila dilê heywan
jê re bête dayîn û bila ji ser wê ve
heft wext derbas bibe. 17 Darazî
bi fermana milyaketên parêzger
û kar bi gotina pîrozan bûye, da
ku, yên dijîn bila bi vêya bizani-
bin ku li ser qiraletiya mirovan
Yê ku Bilind e serweriyê dajo û
wê dide zilamê ku jê re dixwaze û
herî nizmê mirovan datîne ser wê.
18 Ez, qiral Nebûkadnetsar, vê
xewna dîtim; tu, ya Belteşatsar,
şirova wê tu bêje, ji ber ku hemû
zilamên bi zanyar yên welatê min
nikarin şirovê ji min re bibêjin; lê
belê tuyê bikaribe ji min re bighî-
ne, ji ber ku ruhê îlahên pîroz di
te de ye!

*Danîêl xewnê Şirove dike*

19 Wê gavê Danîêlê ku navê wî
Belteşatsar e, demekê şaşbûyî
ma û fikrên wî, wî kesirandin.
Qiral axifî û got: Ya Belteşatsar,
bila xewn û şirova wê te neke-
sirîne. Belteşatsar bersivê da û
got: Efendiyê min, bila ev xewn
li serê yên ku ji te dikerihin û
şirova wê li serê neyarên te bin!
20 Ew darê te dît, yê ku mezin bû
geş bû, qama wê gîhaşt ezmanan
û ji hemûya dinê ve dihat dîtin;
21 ew darê ku, pelên wê xweşik
û fêkiyê wê pirr bû û di wê de
bona her kesî xwarin hebû; hey-
wanên beyarê li bin wê rûniştin
û civîkên ezmanan li guliyên wê

1 Mêw.

dahatin; 22 ew dar tu yî ya qiral,
tu ku, mezin bû û geş bû û mezin-
tiya te zêde bû û gîhaşt ezmanan
û serweriya te gîhaşt nîçikê erdê.
23 Û madem qiral dît ku milya-
ketek parêzger û pîroz ji ezma-
nan ve daket û: Dar jê bikin û wê
xerab bikin, lê belê dalîtên rehên
wê bi hesin û tûncê bi toq bikin û li
erdê, di nav gîhayê teze yê beyarê
de bihêlin û bila bi xunava beya-
rê ve şil bibe û heta ku heft dem
ji ser wê ve derbas bibin, bila tevî
heywanan di gîhayê erdê de para
wê hebe digot; 24 ya qiral, şirovê
û fermana Yê Bilind, ê ku bi ser
efendiyê min qiral ve hatiye ev e:
25 Tuyê ji nav mirovan ve bête
qewirandin û tuyê tevî heywanên
beyarê rûnê û dê mîna ganêran
gîha bi te bidin xwarin û tuyê
bi xunava ezmanan ve şil bibe û
heta ku tu bizanibe Yê Bilind li
ser qiraletiya mirov ve serweriyê
dajo û wê dide zilamê ku canê
wî dixwaze, dê heft dem di ser te
de derbas bibin. 26 Û madem ku
bona dalîta rehên darê bête ber-
dan emir dan; paşî ku tu, dizanî
ezman serwerê dajon, dê qirale-
tiya te bona te bête peyde kirin.
27 Ji ber vê yekê, ya qiral, bila
şîreta min ji te re meqbûl be û bi
baweriyê sûcên xwe û bi heyfa
xwe ya ku ji zebûnan re tê fesadi-
yên xwe bişikîne; dibe ku reheti-
ya te bête dirêj kirin!

*Xewn tête cîh*

28 Hemûyên vana hatin serê qiral
Nebûkadnetsar. 29 Paşî donzdeh
mehî qiraletiya Babîlê li ser qesra
wî digeriya. 30 Qiral axifî û got:
Bona ku bibe mala qiral, Babîla
mezin ya ku bi qudreta quweta
xwe û bona mezintiya semyana
xwe ava kirime, ma ne ev e?
31 Hîn gotin di devê qiral de bû, ji
ezmanan ve dengek daket: Ya qi-
ral Nebûkadnetsar, ji te re tête go-
tin: Qiraletî ji te çû! 32 Û tuyê ji
nav mirovan ve bête qewirandin û
tuyê tevî heywanên beyarê rûnê;
dê mîna ganêran gîha bi te bidin
xwarin û heta ku tu bizanibe Yê
Bilind li ser qiraletiya mirovan ve
serweriyê dajo û wê dide zilamê
ku canê wî dixwaze, dê heft dem
di ser te de derbas bibin! 33 Û ev
gotin li ser Nebûkadnetsar hema
di wê saetê de hate cîh û ji nav mi-
rovan ve hate qewirandin û heta
ku porên wî bûn mîna perîkên
qertela û neynûkên wî mîna yê
civîkan dirêj bûn, mîna ganêran
gîha xwar û bedena wî bi xunava
ezmanan ve şil bû.
34 Û paşî wan rojan, ez, Nebûkad-
netsar çavên xwe berbi ezmanan
ve rakirim û hişê min hate serê
min û Yê ku Bilind e pîroz kirim
û ji yê ku abadîn dijî re hemd ki-
rim û bilindahiyê dam; ji ber ku
serweriya wî serweriya abadîn e û
qiraletiya wî ji demê heta deman

didome 35 û hemûyên ku li dinê
rûdinin tuneyiyek tên hesibandin
û di artêşa ezmanan de û di nav
yên ku li dinê rûdinin de li gor
xwesteka xwe dike[1] û tu kesê ku
destê wî bisekinîne û jê re: Tu çi
dikî? bibêje nîne. 36 Hema di wê
wextê de hişê min hate serê min
û bona bilindahiya qiraletiya min
semyana min û rewnaqiya minî di-
biriqe dîsa hatin ser min û zilamên
min yên mezin tevî şîretkirên min
li min geriyan û ez di qiraletiya
xwe de hatim zeximandin û hîn
jî mezinahî tevî bilindahiya min
bû. 37 Niha ez, Nebûkadnetsar,
ez ji Qiralê ezmanan re şikir di-
kim û bilind dikim û mezinahiyê
didim wî; ji ber ku hemû karên wî
rasteqînî û rêyên wî dadî ne û yê
qudreta wî heye ku dikare yên bi
kubrê dimeşin nizm bike ew e.

*Şahiya ku Qiral Belşatsar dide*

5 Qiral Belşatsar, ji zilamên xwe
yî mezin ji hezar kesî re ziya-
fetek mezin çêkir û li ber wan,
hezar kesî, xemrê vexwar. 2 Gava
Belşatsar bi xemrê ve bi zewqê
ket, bona feraxên zêr û zîv yên
bavê wî Nebûkadnetsar ji perest-
geha ku li Orşelîmê ye aniye bînin
û qiral û zilamên wî yên mezin,
jinên wî û cariyên wî bi wan ve-
xwin, emir da. 3 Wê gavê feraxên
zêrîn yên ku ji perestgeha mala
Xwedê ya ku li Orşelîmê ye hati-
ne derxistin anîn û qiral û zilamên
wî yên mezin, jinên wî û cariyên
wî bi wan vexwarin. 4 Xemrê ve-
xwarin û ji îlahên zêr û zîv, tûnc,
hesin, dar û kevir re pesnê dan.
5 Hema di wê saetê de tilîkên destê
mirovekî xuyanî bûn û li hemberî
şimadankê, li ser sîwaxa dîwarê
qesra qiral ve nivîsand û qiral kefa
vî destê ku dinivîse dît. 6 Wê gavê
wecê qiral hate guhertin û fikrên
wî, wî kesirandin û cîhên lîvok
yên pişta wî sist bûn û çongên wî
li hev ketin. 7 Bona remildaran,
Kildaniyan û sêrbazan bînin, qiral
bi dengekî bilind bang kir. Qiral
bi zilamên bi zanyar yên Babîlê
re axifî û ji wan re got: Her kî vê
nivîsê bixwîne û wateya[2] wê ji min
re bibêje, dê erxewanî bê lê kirin û
gerdaniya zêrîn dê bi histuyê wî ve
bête dakirin û dê di hundirê welêt de
bibe serwerê sêwemîn. 8 Wê gavê
hemû zilamên bi zanyar yên qiral
ketin hundir; lê belê hêz neanîn ku
nivîsê bixwînin û wateya wê ji qiral
re bibêjin. 9 Wê gavê qiral Belşatsar
zehf kesirî û wecê wî guherî û
zilamên wî yên mezin şaş bûn.
10 Li ser gotina qiral û zilamên
wî yên mezin qiralîçe hate mala
ziyafetê; qiralîçe axifî û got: Ya
qiral, abadîn bijî! Bila ramanên

1 An jî: Bikar tîne.
2 Mane, mehne.

te, te netirsînin û wecê te bila
xwe neguhere! 11 Li welatê te,
zilamekî ku ruhê îlahên pîroz tê
de hene, heye û di rojên bavê te
de di wî de ronahî û fêhmkarî û
mîna zanyariya îlahan zanyar ha-
tiye dîtin û bavê te, qiral Nebû-
kadnetsar, bona ku bibe serokên
remildaran, Kildaniyan û sêrba-
zan, ya qiral, bavê te wî danî!
12 Ji ber ku di vî zilamê ku qi-
ral navê Belteşatsar daniye de,
di Danîêl de ruhekî herî qenc û
zanîn û fêhmkarî, ruhekî şiroveya
xewnan û vekirina tiştenokan
û vekirina girêkan hatiye dîtin.
Niha bila Danîêl bête bang kirin
û dê ew ê mahnê nîşan bide!
13 Wê gavê Danîêl anîn ber qi-
ral, qiral axifî û ji Danîêl re got:
Ma ew Danîêlê ku ji sirgûnên
Cihûdayê yî, yê bavê min qiral
wî ji Cihûdayê aniye tu yî? 14 Ji
bo te bihîstim ku, di te de ruhê
îlahan heye û ronahî û fêhmkarî
û zanyariya herî qenc di te de
ye! 15 Û niha bona ku vê nivîsa
bixwînin û wateya wê ji min re
bibêjin, zilamên bi zanyar, remil-
daran anîn ber min; lê belê hêz
neanîn ku wateya vî tiştî nîşanî
min bidin. 16 Û bona te bihîstim
ku, tu dikarî wateyan derxînî û
tu dikarî girêkan vebikî; niha ger
tu bikaribe vê nivîsê bixwîne û
wateya wê ji min re bibêje, dê er-
xewanî li te bikin û dê gerdaniya
zêrîn bi histuyê te ve dakin û tuyê
di hundirê welêt de bibe serwerê
sêwemîn.
17 Wê gavê Danîêl bersivê da
û li ber qiral got: Bila diyariyên
te ji te re bin û xelatên xwe bide
kesekî din; ez ê dîsa nivîsê ji qi-
ral re bixwînim û ez ê wateya
wê jê re bighînim. 18 Ya qiral!
Xwedayê Bilind ji bavê te Nebû-
kadnetsar re qiraletiyê û mezinti-
yê û bilindahî û rewnaqiyê dabû
19 û ji ber mezintiya ku daye wî
hemûyên neteweyan, gel û zima-
nan ji ber wî lerizîn û tirsiyan; zi-
lamê ku dixwest dikuşt û zilamê
ku dixwest bi saxî dihişt û zilamê
ku dixwest bilind dikir û zilamê
ku dixwest nizm dikir. 20 Lê belê
gava dilê wî bilind bû û ruhê wî
heta ku ji ser xwe ve biçe tund bû,
ji texta qiraletiyê ve hate daxistin
û bilindahiya wî ji ser wî ve hate
rakirin 21 û ji nav lawên mirovan[1]
ve hate qewirandin û dilê wî mîna
yê heywanan hate kirin û bi kerên
kovî re rûnişt û mîna ganêran gîha
pê dan xwarin û heta fêhm kir ku
li ser qiraletiya mirov Xwedayê
Bilind serweriyê dajo û wê dide
zilamê ku canê wî jê re dixwaze,
bedena wî bi xunava ezmanan ve
şil bû. 22 Û lawê wî Belşatsar, tu,
çawa ku tu bi vana hemûyan ve
dizanî, lê dîsa jî te dilê xwe nizm

[1] Yanê ji nav mirovan ve.

nekir 23 û li hemberî Xudanê ez-
manan te xwe bilind kir û feraxên
mala wî anîn ber te û tu û zilamên
te yî bilind, jinên te û cariyên te,
we bi wan re xemrê vexwarin û
te ji îlahên zîv û zêr û tûnc, hesin,
dar û kevir re, ji îlahên ku nabînin
û nabihîzin û zanîna wan nîne
re pesnê da û te mezintiyê neda
Xwedê, ew Xwedayê ku hilma te
di destê wî de ye û hemû rêyên te
yên wî ne. 24 Wê gavê ev dest ji
aliyê wî ve hate şandin û ev nivîs
hate nivîsandin.
25 Û nivîsa ku hatiye xet kirin
ev e: MENE, MENE, TEKEL,
ÛFARSÎN[1]! 26 Wateya vî tiştî
ev e: MENE; Xwedê rojên qira-
letiya te jimart û dawiya wê anî!
27 TEKEL; tu di tereziyê de hate
wezinandin û tu kêm hate dîtin!
28 PERES; welatê te hate par ki-
rin û ji Medan û Farisan re hate
dayîn!
29 Wê gavê Belşatsar emir da û
erxewaniyê li Danîêl kirin û ger-
daniya zêrîn bi histuyê wî ve da-
kirin û bi gotina: Dê di hundirê
welêt de bibe serwerê sêwem
bona wî bang kirin.
30 Belşatsarê qiralê Kildanî wê
şevê hate kuştin. 31 Û Daryûsê
Medê gava şêst û du salî bû, qira-
letiyê bi dest ve xist.

*Danîêl davêjin kortala Şêran*

6 Wekî di hundirê hemûya welêt
de hebin, sed û bîst satrapî li
ser welêt 2 û wekî yek Danîêl be,
sê wezîran li ser wan danîn ji Dar-
yûs re qenc hate xuyanî kirin; da
ku, bila van satrapan hisabê bidin
wezîran ku bila xesar negihêje qi-
ral. 3 Wê gavê Danîêl ji wezîran
û ji satrapan ve seretetir bû, ji ber
ku di wî de ruhekî herî qenc hate
dîtin û qiral pêşniyarê kir ku wî
deyne ser hemûya welêt.
4 Wê gavê wezîr û satrapan li
fersendê geriyan ku li dijî Danîêl
ji karên welêt ve giliyê bikin, lê
belê ne fersenda gilîkirinê ne jî
sûcê dîtin. Ji ber ku ew dilsoz bû
û di wî de ne çewtiyek[2] ne jî sûc
hat dîtin. 5 Wê çaxê van zilaman
gotin: Ger em li dijî vî Danîêlî ji
ber zagona Xwedayê wî nebînin,
em ê li dijî wî fersenda gilî kirinê
nebînin. 6 Wê çaxê van wezîran û
satrapan bi ser qiral ve kom bûn
û jê re wusa gotin: Qiral Daryûs,
abadîn bijî! 7 Ji îlahekî an jî ji mi-
rovekî, xeynî ji te ya qiral, her kî
heta sîh rojî xwestekekê bixwa-
ze, ji bo bê avêtinî kortala şêran,
bo zagonek qiral û qedexeyiyek
xwurt bête danîn, hemû wezîrên
welat, qeymiqaymên wê û sat-
rapên wê, şîretkir û waliyên wê

1 Mene, hatiye jimartin, Tekel, hatiye wezinandin, Ûfarsîn û liqan.

2 Xetakek.

bi hev re şêwirîn. 8 Niha ya qiral,
qedexeyiyê deyne, li gor zagona
Medan û Farisan ya ku nayê gu-
hertin nivîsê destxet bike ku, bila
neguhere! 9 Li ser vêya qiral Dar-
yûs nivîsê û qedexeyiyê destxet
kir.
10 Û dema Danîêl bihîst ku nivîs
hatiye destxetî kirin çû mala xwe û
şivakeyên odeya wî berbi Orşelîmê
vekirîbûn û mîna ku berê dikir, di
rojê de sê carî çong danî û dua kir û
li ber Xwedayê xwe şikiryê kir. 11
Wê gavê van zilaman bi ser hev ve
kom bûn û Danîêl li ber Xwedayê
xwe di dua û lava kirinê de dîtin.
12 Wê gavê nêzîk hatin û bona
qedexeya qiral, li ber qiral gotin:
Ma bi gotina ku, her zilamê ji
îlahekî an jî ji mirovekî, xeynî te
ji kesekî din ya qiral, ger tiştekî
bixwaze bila bête avêtinî kortala
şêran, te qedexeyiyekê destxet
nekir? Qiral bersivê da û got: Li
gor zagona Medan û Farisan ya
ku nayê guhertin, ev gotin rast e.
13 Wê gavê bersivê dan û li ber
qiral gotin: Ji sirgûnên Cihûdayê
vî Danîêla, te, ya qiral û nivîsa ku
te destxet kiriye nahesibîne û rojê
sê carî duaya xwe dike! 14 Wê
çaxê dema qiral van gotinan bihîst
zehf xeyidî û xelaskirina Danîêl
xist dilê xwe û bona ku wî azad
bike heta ku roj çû ava xebitî.
15 Wê gavê van zilaman bi ser qiral
ve kom bûn û ji qiral re gotin: Ya
qiral, bizanibe ku, zagona Medan
û Farisan e, tu zagon û qedexeyiya
ku qiral daniye nayê guhertin!
16 Wê çaxê qiral emir da û Danîêl
anîn û avêtin kortala şêran. Qiral
axifî û ji Danîêl re got: Xwedayê
te yê ku bêsekin tu jê re qûlitiyê
dike, dê ew ê te xelas bike! 17 Û
kevirekî anîn û danîn devê kortalê
û ji bona ku di derheqê Danîêl
de tu tişt neyê guhertin, qiral bi
gustîlka xwe yî mohrê û bi gustîl-
ka mohrê ya zilamên xwe yî me-
zin, kevir mohr kir. 18 Wê çaxê
qiral çû qesra xwe, xwarinê nex-
war û bi vî awayî şevê buhart û
taxima sazê neanîn ber wî û xewa
wî reviya.
19 Wê çaxê qiral sibehê pirr zû
rabû û bi lezî çû kortala şêran.
20 Û dema nêzîkî kortalê, Danîêl
bû bi dengekî bi keser feryad kir;
qiral axifî û ji Danîêl re got: Ya
Danîêl, qûlê Xwedayê zindî, ma
Xwedayê te, yê ku tu bêsekin jê
re qûlitiyê dikî, te ji destê şêran
xelas kir? 21 Wê çaxê Danîêl ji
qiral re got: Ya qiral, abadîn bijî!
22 Xwedayê min milyaketê xwe
şand û devê şêran girt û nepelişîn
min; ji ber ku li ber wî di min de
sûc nehat dîtin û li ber te jî ya qi-
ral, karekî bi zirar nekirim! 23 Wê
çaxê qiral zehf kêfxweş bû û bona
ku Danîêl ji kortalê derxînin emir
da. Û Danîêl ji kortalê ve hate
derxistin û di wî de tu êş û birîn

nehat dîtin, ji ber ku bi Xwedayê
xwe ve ewle bûbû.
24 Û qiral emir da û wan zilamên
ku giliya Danîêl kirine anîn û wan,
lawên wan û jinên wan avêtin
kortala şêran û hîn negihîştibûn
binê kortalê, şêran wan hingavtin
û hemû hestiyên wan şikandin.
25 Wê gavê qiral Daryûs ji hemû
netewe, gel û zimanên ku li
hemûya dinê rûdinin re nivîsand:
Bila xweşiya we zêde be! 26 Ez
fermanê didim ku, mirovên li
welatê hemûya qiraletiya min de
ne, bila ji Xwedayê Danîêl ve
bilerizin û bitirsin; ji ber ku ew
Xwedayê zindî ye û bi abadînan
ve her tim daîm û nemir e û qira-
letiya ku dê xera nebe qiraletiya
wî ye û serweriya wî heta dawi-
yê didome! 27 Xelas dike û azad
dike û li ezmanan û li erdê nîşan
û nuwazeyan bi kar tîne; yê ku ji
lapûşkê şêran Danîêl xelas kiriye
ew e.
28 Û di qiraletiya Daryûs de û di
qiraletiya Koreşê Farisî de karên
vî Danîêlî qenc çûn.

*Di derbarê çar Afirî de xewna Danîêl*

Met 24,6-8.15-35; Pey 19,11-16

7 Di sala yekem ya Belşatsarê
qiralê Babîlê de, Danîêl di nav
livînê xwe de xewnekê û xewn
û xeyalên serê xwe dît; wê çaxê
xewnê nivîsand û hemûyên van
tiştan got. 2 Danîêl axifî û got:
Şevê di xewn û xeyalê xwe de
dîtim û a vay, çar bayên ezma-
nan êrîşî behra mezin kirin. 3 Û ji
behrê ji hev cudatir çar cenawirên
mezin derketin. 4 Ya yekem mîna
şêr bû û bazikên wî yên qertel he-
bûn. Heta ku bazikên wî hatin jêki-
rin û ji erdê ve hate rakirin û mîna
mirov li ser du pêlî hate sekinan-
din nihêrtim û dilekî mirov jê re
hate dayîn. 5 Û a vay, cenawirekî
din, ev yê duwem, mîna hirç bû û
bi ser aliyekî xwe ve lukumî û di
devê wî de di nav diranên wî de
sê hestiyên parsuyan hebûn û jê re
wusa gotin: Rabe û zehf goşt bi-
xwe! 6 Paşî viya nihêrtim û a vay,
yekî din, wekî piling bû û li pişta
wî çar heb bazikên civîka hebûn
û çar heb seriyên vî cenawirî he-
bûn û serwerî ji wî re hate dayîn.
7 Paşî vêya di xewn û xeyalên
şevê de dîtim û a vay, cenawirekî
çaremîn yê toqînê dide û dibizdîne
û zehf dijwar e û diranên wî yên
hesin yên mezin hebûn; dadiqurt
û diperçiqand û yê ku ji ber maye
jî bi lingên xwe ve dicût; ji cena-
wirên berî xwe hemûyan cudatir
bû û deh heb qiloçên wî hebûn.
8 Baş li qiloçan nihêrtim û a vay, ji
nav wan qiloçekî din, yekî biçûkê
wê, derket û sê heb ji qiloçên wî
yên berê, ji ber wê hatin rakirin û
a vay, di vî qiloçî de mîna çavên
mirovan çav û devekî ku tiştên
mezin dibêje hebûn.

9 Heta ku text hatin ava kirin û
heta ku yê rojên wî kevn in rûnişt
nihêrtim; kincên wî mîna berfê sipî
û porê serê wî mîna peşmê paqij
bû; texta wî pêtên agir û tekerên
wî agirê ku dişewitî bû. 10 Ji ber
wî çemê agir derdiket û diherikî;
bi hezaran hezar jê re xizmetê di-
kirin û bi deh hezaran deh hezar li
ber wî li ser lingan disekinîn; dad-
geh hate ava kirin û pirtûk hatin
vekirin. 11 Ji ber dengê gotinên
mezin yên ku qiloç wan digot, wê
gavê min dinihêrt, heta ku cena-
wir hate kuştin û bedena wî hate
tune kirin û bona di agir de bête
şewitandin hate dayîn nihêrtim.
12 Û gava em bên cenawirên din,
serweriyên vana hatin stendin; lê
belê temenên wan heta demekê û
heta wextekê hate dirêj kirin.
13 Di xewn û xeyalên şevê de
dîtim û a vay, yekî mîna lawê mi-
rov bi ewrên ezmanan ve hat û hat
heta cem yê ku rojên wî kevn in
û li ber wî, wî nêzîk kirin. 14 Û
bona ku hemû neteweyan, gelan û
zimanan jê re qûlitiyê bikin, jê re
serwerî û mezinahî û qiraletî hate
dayîn; serweriya wî serweriyek
ku dê derbas nebe û abadîn be û
qiraletiya wî qiraletiyek ku xerab
nabe ye.

*Şirova xewnê*

15 Lê ez, Danîêl, ruhê min di hun-
dirê qalibê min de êşiya û xewn
û xeyalên serê min, min kesiran-
din. 16 Û nêzîkî yekî ji yên ku li
ser pêlan disekinin bûm û ji ber
hemû van yekan bi gotina: Gelo
rasteqînî çî ye? jê re pirsiyam. Û
ji min re got û wateya van tiştan ji
min re gîhand. 17 Ev çar cenawirê
mezin, çar qiralê ku dê ji erdê ve
derkeve ne. 18 Lê belê dê pîrozên
ku Yê Bilind in qiraletiyê rahêjin
û dê heta abadînê û heta abadînên
abadînê ew ê qiraletiyê bi dest ve
bigirin. 19 Û ji ber cenawirê ça-
remîn yê ku ji hemûyan cudatir e
û diranên wî yên zehf tirsehêz ji
hesin û neynûkên wî ji tûncê ne û
dadiqurtîne û diperçiqîne û yê ji
ber mayî ye jî bi lingên xwe dicû
20 û ji deh qiloçên ku li serê wî
ne û ji ber qiloçên din yê derketi-
ye, ka rasteqînî çî ye, xwestim ku
fêhm bikim; ew qiloçê din, yê ku
ji ber wî sê qiloç ketibûn û çavên
wî hebûn û devê wî yê ku tiştên
mezin dibêje hebû û xuyabûna wî
ji yên din girtir bû. 21 Nihêrtim û
pîrozan û ew qiloçî pev re cengê
dikirin 22 û heta yê ku rojên wî
kevn in were û darazî ji pîrozên
Yê Bilind in re bête dayîn û heta
yên pîroz qiraletiyê bi dest ve xis-
tin li dijî wan bi ser ve ket.
23 Wusa got: Cenawirê çaremîn,
dê li ser erdê, ji hemû qiraletiyan
cudatir hemûya erdê daqurtîne û
dê bibe qiralê çaremîn yê wê bicû
û biperçiqîne. 24 Û dema em we-

rin deh qiloçî, dê ji vê qiraletiyê
deh qiral derkeve û dê piştî wan
yekî din derkeve û dê ji yên berê
cudatir be û sê qiralî bixîne. 25 Û
dê li dijî Yê ku Bilind e, gotinan
bibêje û pîrozên Yê Bilind bihin-
cirîne û dê pêşniyariya guhertina
deman û zagonê bike û heta wex-
tekê û heta wextan û nîv wextî dê
bi destên wî ve bên dayîn. 26 Lê
belê dê dadgeh bête damezirandin
û bona ku heta dawiyê serweriya
wî biqedînin û tune bikin dê wî
rahêjin. 27 Û dê qiraletî û serwerî
û mezintiya hemû qiraletiyên ku
di bin ezmanan de ne, dê ji pîro-
zên Yê Bilind in re bên dayîn;
qiraletiya wî qiraletiya abadîn e
û hemû serwerî dê jê re qûlitiyê
bikin û serî jê re xwar bikin. 28
Dawiya kar heta vê derê, lê ez,
Danîêl, fikrên min, min tirsandin
û wecê min xwe guherî; lê belê vî
karî di dilê xwe de veşartim.

*Xewn û xeyala di derbarê Beran û Nêrî de*

8 Paşî xewn û xeyala di dest-
pêkê de ji min re hate xuya
kirin, di sala sêwemîn ya qirale-
tiya qiral Belşatsar de ji min re,
ji Danîêl re xewn û xeyalek hate
xuya kirin. 2 Û di xewn û xey-
alê de dîtim û wusa bû ku, dema
min dît, ez li qesra Şûşanê ya li
Elamê ye bûm û di xewn û xeyalê
de dîtim û ez li cem çemê Ûlayê
bûm. 3 Û çavên xwe rakirim û
nihêrtim û a vay, li ber çem be-
ranek sekinî bû û du qiloçên wî
hebûn û ev her du qiloç bilind[1]
bûn; lê yek ji yê din bilindtir bû
û yê ku bilind e dawiyê derket.
4 Min beran berbi rojava û bakur
û başûr ve di qoç lêdanê de dît û
qet tu heywan hêz neanî ku li ber
wî bisekine û kesî ku ji destê wî
xelas bike tunebû û li gor xwes-
teka xwe kir û xwe mezin kir.
5 Û dema ez di ramanê de bûm,
a vay, ji ser hemûya rûyê erdê ve
ji rojavayê nêriyek hat û lingê wî
bi erdê ve nediket û di nav çavên
nêrî de qiloçek wî yê ku bi ber ça-
van ve diket hebû. 6 Û hat cem
beranê ku min wî li cem çem se-
kinî dîtibû û du qiloçên wî hene
û bi tundiya hêza xwe bi ser wî
ve teqizî. 7 Û dîtim ku nêzîkî cem
beran dibe û li dijî wî har bû û li
beran xist û du qiloçên wî şikand
û di beran de bona li ber wî bi-
sekine quwet tunebû û wî li erdê
xist û wî eciqand[2] û kesî ku beran
ji destê wî xelas bike tunebû. 8 Û
nêrî xwe zehf mezin kir û dema
bihêz bû, qiloçê mezin şikest; li
cîhê wê, berbi çar bayê ezmanan,
çar qiloçên ku bi ber çav dikevin
derketin.

1 An jî: Dirêj.
2 Cût.

9 Û ji yekî wan qiloçekî biçûk
derket û berbi başûr û berbi roj-
hilatê û berbi welatê xweşik ve
zehf mezin bû. 10 Heta artêşa ez-
manan jî mezin bû û ji vê artêşa
û ji sitêrkan hinekan xist erdê
û wan cût. 11 Û wî xwe heta
serokê artêşê xwe mezin kir û
pêşkêşiya şewitandinê ya her tim
tête şewitandin jê kişand û rahişt
û cîhê perestgeha wî xera bû.
12 Û artêş û pêşkêşiya ku her tim
tête şewitandin, ji ber gunehê ji
destê wî re hatin dayîn û rasteqî-
niyê li erdê xist û tiştê ku dixwest
kir û karê wî qenc çû. 13 Û pîrozê
ku digot bihîstim û pîrozekî din ji
yê ku gotinê dibêje re got: Bona
ku cîhê pîroz jî artêşê jî ji cûtina
bin lingan re bidin, ev xewn û
xeyala ku bona pêşkêşiya her tim
tête şewitandin û guneha ku xerab
dike ye heta çi wextî ye? 14 Û ji
min re got: Qasî du hezar û sê sed
êvar û sibe bibe ye; dê wê çaxê
cîhê pîroz paqij bibe.

*Şirova xewn û xeyalê*

15 Û wusa bû ku, ez, Danîêl, dema
vê xewn û xeyalê dîtim, bona wê
fêhm bikim lêkolînê kirim û a vay,
yek li hemberî min sekinî, wekî
xuyabûna mirovekî. 16 Û ji nav-
bera çemê Ûlayê dengê zilamekî
bihîstim û bang kir û got: Ya Ceb-
raîl, xewn û xeyalê jê re bibêje!
17 Û nêzîkî cîhê ez sekinîme hat û
dema ew hat, ez bêzar bûm û bi ser
rû ve ketim û ji min re got: Fêhm
bike ya lawê mirov! Ji ber ku ev
xewn û xeyal ji ber wexta dawiyê
ye! 18 Û dema bi min re diaxifî,
wekî wecê min li erdê be ez ketim
xewekî kûr û dest li min da û min li
ser pêlan ve sekinand. 19 Û got: A
vay, ka dê di dema dawîn ya wextê
de çi bibe, ez ji te re bibêjim; ji ber
ku bona wexta bijartî ya dawiyê
ye. 20 Beranê bi du qiloçî yê ku te
dîtiye qiralên Medan û Farsê ne.
21 Û ew nêriyê bi pirç[1], qiralê warê
Yewnanê ye û qiloçê mezin ya ku
di nav çavan de ye qiralê yekemîn
e. 22 Û dema em werin ya şikestî
û li dêvila wê çar qiloç derketiye,
dê ji wî gelî çar qiraletî derkevin,
lê belê dê ne di quweta wî de bin.
23 Û di dema dawîn ya qiraletiya
wan de dema gunehkaran qey-
sên xwe dagirin, dê qiralekî wecê
wî tund û ji tiştenokan fêhm dike
derkeve. 24 Û dê hêza wî xwurt
be, lê belê ne bi quweta wî û dê di
rewşekî şaş dike de xerab bike û dê
karê wî qenc here û dê xwesteka
xwe bike û dê zilamên dijwar û dê
netewa pîroz helaq bike. 25 Û dê
bi baqiliya[2] xwe fenekiyê di destê
xwe de bi berdar bike û dê xwe di
dilê xwe de mezin bike û dê gel-

[1] Mû.

[2] Rêzanî, an jî: Siyaset.

lekî zilamên di nav ewlekariyê de ne helaq bike û dê li dijî Serokê serokan serî hilde; lê belê dê bêyî ku dest lêkeve bişikê. 26 Û ev xewn û xeyala êvarê û sibehê ya ku hatiye gotin rast e; lê belê tu xewn û xeyalê veşêre; ji ber ku bona gellekî rojan e! 27 Û ez, Danîêl, ez ji bîr ve çûm û bi rojan nexweş ketim û pişt re rabûm û karên qiral çêkirim û bi vê xewn û xeyalê şaş bûm, lê belê kesî ku fêhm bike tunebû.

*Danîêl dua dike*

1.Qiral 8,46-53; Esr 9; Neh 1 û 9

**9** Di sala yekemîn ya Daryûsê lawê Ahaşveroşê ku ji nîjada Medan e de, ew Daryûsê ku li ser warê Kildaniyan ve hatibû qiral kirin, 2 di yek saliya qiraletiya wî de ez, Danîêl, bona dema xerabiyetên Orşelîmê tijî bibe, hejmara salên ku ji aliyê XUDAN ve ji Yêremya peyxamber re hatiye ji pirtûkan fêhm kirim, heftê sal.

3 Û di cilikê[1] de û di xweliyê de, bi dua û bi lavayan, bi rojiyê bona gerîna Xudan Xwedê berê xwe dam wî. 4 Û ji Xwedayê xwe XUDAN re dua kirim û mukir hatim û gotim: Ax, ya Xudan! ji Xwedayê mezin û tirsehêz yê ku bi yên ji xwe hez dikin û emirên wî digirin re sond û bexşandina xwe diparêze! 5 Me sûc kir û me rêşaşiyê kir û me xerabî kir û em ji emir û daraziyên te çewt bûn û bi vî awayî bûn asê 6 û me qûlên te yên peyxamber, yên ku bi navê te ji qiralên me re, ji serokên me re û ji bapîrên me re û ji hemû netewa welêt re gotine guhdarî nekirin. 7 Ya Xudan, dadî ji te re û mîna ku îroj wusa ye, rûreşî ji me re, ji mêrên Cihûdayê re û ji yên ku li Orşelîmê rûdinin re û ji ber xayîntiya ku li dijî te kirine, li hemû welatên ku te wan ajotiye, ji hemûya Îsraêla ku li nêzîk û dûrê ye. 8 Ya XUDAN! Rûreşî ji me re, ji qiralên me re, ji serokên me re û ji bapîrên me re, ji ber ku me li dijî te sûc kir! 9 Dilovanî û borîn ya Xwedayê me Xudan e; ji ber ku me li dijî wî sûc kir 10 û bona ku di zagona wî ya bi destê qûlên xwe yî peyxamber daniye ber me de bimeşin, me gotina Xwedayê xwe XUDAN guhdarî nekir. 11 Û bona ku gotina te guhdarî nekin, hemûya Îsraêlê çewt bûn û ji zagona te wêdetirê derbas bûn û sond û naleta ku di pirtûka Mûsayê zilamê Xwedê de hatiye nivîsandin, bi ser me ve hate rijandin; ji ber ku me li dijî wî sûc kir. 12 Û çawa ku xerabiya mezin bi ser me ve anî, li dijî me û li dijî serwerên me ên ku li ser me serweriyê dajon re gotinên xwe zeximand; ji ber mîna ku li Orşelîmê hatiye kirin, di bin hemû ezmanan de nehatiye kirin.

---

[1] Yanê çûl.

13 Mîna ku di zagona Mûsa de
hatiye nivîsandin, hemûya vê xe-
rabiya hate serê me; lê belê bona
ku em ji fesadiyên xwe vegerin
û di rasteqîniya te de bi fêhmkarî
bin, me wecê XUDAN, Xwedayê
xwe nexwestin. 14 Û di anîna xe-
rabiya ku anî ser me de XUDAN
bi zîrekî kir û wê anî ser me; ji
ber ku di hemû karê xwe yî dike
de Xwedayê me XUDAN bi dad
e û me gotina wî guhdarî nekir.
15 Û niha, tu ku, te netewa xwe
ji warê Misirê bi destekî xwurt ve
derxist û mîna ku îroj wusa ye, te
ji xwe re nav û deng qezenc kir,
ya Xwedayê me Xudan! Me sûc
kir, me xerabî kir. 16 Ji ber hemû
karên te yî bi dadî, ya Xudan, ez
hewînê ji te dikim, bila hêrs û xey-
da te ji bajarê te, ji Orşelîmê, ji çi-
yayê te yî pîroz vegere! Ji ber ku,
ji ber sûcên me û ji ber fesadiya
bapîrên me, Orşelîm û netewa te ji
hemûyên ku li dora me ne re riswa
bûn. 17 Û niha, ya Xwedayê me,
dua û lavayên vî qûlê xwe guhdarî
bike û wecê xwe li ser perestgeha
xwe yî wêrane, di oxra Xudan de
bibiriqîne! 18 Ya Xwedayê min,
guhê xwe xwar bike û bibihîze!
Çavê xwe veke û li wêraneyên me
û li bajarê ku bi navê te tête bang
kirin binêre! Ji ber ku ne ji ber ba-
weriya me, lê ji ber dilovaniyên
te yî mezin em lavayên xwe li ber
te pêşkêş dikin! 19 Ya Xudan, bi-
bihîze! Ya Xudan, bibexşîne! Ya
Xudan, qenc guhdar be û bike;
di oxra xwe de dereng nexîne, ya
Xwedayê min! Ji ber ku bajarê te
û netewa te, bi navê te tên bang
kirin.

### *Cebraîl daxuyaniyê dike*

Gal 4,4-5; Lûq 24,44-47; Met 24,15

20 Û hîn ez di gotinê de bûm û di
dua kirinê de û mukiriya sûcê xwe
û netewa xwe Îsraêlê dihatim û hîn
bona çiyayê pîroz yê Xwedayê xwe
lavayên xwe li ber Xwedayê xwe
XUDAN pêşkêşî dikirim; 21 belê,
hîn ez di duê de di axaftinê de bûm,
zilamê Cebraîl, yê ku di destpêkê
de di xewn û xeyalê de dîtibûm, di
demên pêşkêşiya êvarî de bi lezî
firiya û hate cem min. 22 Û ji min
re got û bi min re axifî û got: Ya
Danîêl bona ku zanyarî û fêhmka-
riyê bidim te niha derketim. 23 Di
destpêka lavayên te de emir derket,
ez jî bona ku ji te re bighînim ha-
tim; ji ber ku tu yekî zehf jê tê hez
kirin î û bi vî karî bizanibe û xewn
û xeyalê fêhm bike!
24 Bona qedandina gunehê û da-
wiya sûcan bîne û bona fesadiyê
kirina kefaretê û bona ku bawe-
riya abadîn bîne hundir û xewn
û xeyalê û peyxambertiyê mohr
bike û bona pîrozê pîrozan mesh
bike li ser netewa te û li ser ba-
jarê te yî pîroz heftê hefte hate
tespît kirin. 25 Û bizanibe û fêhm

bike ku, bona ava kirina Orşelîmê
û bona anîna rewşa wê yî berê ji
derketina emir heta serwerê ku
hatiye mesh kirin[1], dê heft hefte
û şêst û du hefte hebin û dîsa dê
ew bi kuçe û kendê bê ava kirin,
dê ev jî di dema tengasiyê de be.
26 Û paşî van şêst û du hefte yî dê
yê ku hatiye mesh kirin, bête jê-
kirin û avêtin û dê tiştekî wî tune
be û dê netewa serwerê ku were
bajêr û cîhê pîroz xera bikin û dê
dawiya wî bi tofanê be û dê heta
dawiyê ceng bibe; ji bo bûyîna
xerabiyê jî qerar hat dan. 27 Û dê
bi gellekan re peymanek xwurt ya
hefteyekî bibire û di nava heftê de
dê qurban û pêşkêşiyê bisekinînin
û dê li ser bazikên tiştên mekrûh
kesekî ku xera dike were û heta
dawiya bitûmî, ev jî hatiye darazî
kirin, dê bi ser wêraneyê hêrs bête
rijandin.

*Xewn û xeyala ku Danîêl di Çemê Dîjleyê de dîtiye*

Pey 1,12-18

10 Di sê saliya Koreşê qiralê
Farsê de, ji Danîêlê ku bi
navê Belteşatsar tête bang kirin
re tiştek hate vekirin û ev tişt ras-
teqînî bû û şerekî mezin bû û vî
tiştî fêhm kir û di xewn û xeyalê
de fêhmkariya wî hebû. 2 Di wan
rojan de, ez, Danîêl, min sê hefte
şînê digirt. 3 Heta bitûmî sê hefte
temam bûn, xwarina qenc nexwa-
rim û goşt û xemr neketin devê
min û qet rûnê di xwe de nedam.
4 Û di roja bîstan ya meha yekemîn
de ez, dema li qeraxa çemê me-
zin, li ya Dîjleyê bûm, 5 çavên
xwe rakirim û nihêrtim û a vay,
zilamekî ku kitanan li xwe kiriye
û zêrê Ûfazê yê safî li pişta xwe
girê dayiye 6 û bedena wî yaqûda
ezmanî û wecê wî mîna xuyabûna
birûskê û çavên wî mîna pêtalên
bi agir û mil û pêlên wî mîna tûn-
cê bi sîqal û gurmîniya gotinên wî
mîna gurmîniya komalekê bûn.
7 Û ez, Danîêl, tenê min xewn û
xeyalê dît û zilamên ku tevî min
bûn xewn û xeyalê nedîtin; lê le-
rizînek mezin bi ser wan ve ket û
bona ku xwe veşêrin reviyan. 8 Û
ez tenê mam û vê xewn û xeya-
la mezin dîtim û di min de quwet
nema û rengê wecê min xera bû
û hêz neanîm ku bi quweta xwe
bigirim. 9 Lê belê gurmîniya go-
tinên wî bihîstim û dema gurmînî-
ya gotinên wî bihîstim bi ser wecê
xwe ve ketim xewek kûr û wecê
min li erdê bû.
10 Û a vay, destek li min ket û min
danî ser çongên min û kefên destên
min. 11 Û ji min re got: Ya Danîêl,
zilamê ku zehf jê hatiye hez kirin!
gotinên ku ez ji te re dibêjim fêhm
bike û rabe ser pêlan; ji ber ku
niha ji te re hatim şandin! Û dema

1 Bi Îbranîtî: Paqijkar, Mesîh.

vê gotinê ji min re got, bi lerizînê
li ser pêlan sekinîm.
12 Û ji min re got: Ya Danîêl, me-
tirse! Ji ber ku gotinên te ji roja
pêşîn ya ku te bona fêhm kirinê
û li ber Xwedayê xwe, xwe nizm
kirinê xistiye dilê xwe hatin bihîs-
tin û ji ber gotinên te ez hatim!
13 Lê belê serokê Farsê bîst û yek
roj li dijî min sekinî û a vay, Mî-
kaêlê ku yek ji serokên yekemîn
e, bona ku alîkariyê ji min re bike
hat; ji ber ku ez li wir, li cem qi-
ralên Farsê hatibûm sekinandin[1].
14 Niha ez hatim ku, ka dê di rojê
dawîn de çi bê serê netewa te ez
ji te re bibêjim; ji ber ku ev xewn
û xeyal hîn bona gellek rojan e!
15 Û dema gotinên wusa ji min
re got; wecê xwe bi erdê ve xwar
kirim û bê ziman mam. 16 Û a
vay, yekî mîna lawên mirov des-
tê xwe di lêvên min de da û devê
xwe vekirim, axifîm û ji yê ku li
hemberî min sekiniye re gotim:
Efendiyê min, bi vê xewn û xe-
yalê tengasiyên min bi ser min ve
vegeriyan û ez nikarim bi quweta
xwe bigirim! 17 Û qûlê vî efendi-
yê min çawa dikare bi vî efendi-
yê min re biaxife? Ji ber ku ez, ji
niha ve di min de quwet qediya û
di hundirê min de hilm nema!
18 Wê gavê yekî wekî di xuya-
nîbûna zilam de be, dîsa destê
xwe di min de da û min bihêz kir.
19 Û got: Metirse ya tu, zilamê ku
zehf jê hatiye hez kirin! Ji te re
xweşî be! Xwurt bibe, belê, xwurt
bibe! Û dema ji min re got, xwurt-
tir bûm û gotim: Bêje, efendiyê
min, ji ber ku te min xwurttir kir!
20 Û got: Ma tu dizanî ez bona çi
hatim cem te? Û niha ez ê bona
ku bi qiralê Farsê re cengê bikim
vegerim û dema ez herim, a vay,
dê serokê welatê Yewnanê were!
21 Lê belê ez ê ya ku di nivîsa ras-
teqîniyê de hatiye xêz kirin, ji te
re bighînim û li dijî wan xeynî se-
rokê we Mîkaêl tu kesê ku ji min
re bûye alîkar nîne.

*Qiralên Başûr û Bakur*

11 Û ez, di sala yekemîn ya
Daryûsê Medî de, bona ku
wî bizexmînim û quwetê bidim
wî, li cem wî sekinîm.
2 Û niha ez rasteqîniyê ji te re
bighînim. A vay, dê li Farsê hîn
sê qiralê din derkevin û dê yê ça-
remîn ji hemûyan jî dewlemendtir
bibe û dema ji ber dewlemendiya
xwe xwurt bibe, dê li dijî welatê
Yewnanê hemûyan hişyar bike. 3
Û dê qiralekî egîd derkeve û dê bi
hêzekî mezin serweriyê bajo û dê
li gor xwestina xwe bike. 4 Û der-
keve dernekeve, dê qiraletiya wî
bişkê û dê berbi çar bayê ezmanan
ve tarûmar bibe, lê dê ne bona nîja-
da wî û li gor serweriya ku ajotiye

[1] An jî: Bi tena serê xwe serfiraz bûm.

be; ji ber ku dê qiraletiya wî ji rehê
ve bête rakirin û dê bibe yên ku
ne ji wan in.
5 Û dê qiralê başûrê û yek ji se-
rokên wê xwurt bibin û dê se-
rok ji wê hîn jî xwurttir be û dê
serweriyê bajo; dê serweriya wî
serweriyek mezin be. 6 Û dê paşî
salan yek bibin û bona ku pev-
kirinê bikin, dê qîza qiralê başûr
were cem qiralê bakur; lê belê dê
nikaribe bi hêza bazûya xwe bigi-
re û dê ev qiral jî bazûyê wî jî ne-
sekinin; lê pîrek û yên wê anîne,
bavê wê jî, yên ku wê çaxê bûne
alîkarê pîrekê jî dê bidin dest.
7 Û li dêvila wî dê ji rehên wê
pîrekê zîlek derkeve û dê were
artêşê û dê bikeve birca qiralê
bakur û dê bi wan re biştexile û
bi ser wan bikeve. 8 Û dê îlahên
wan jî tevî pûtên rijandî û feraxên
xweşik yên zêr û zîv bajo û bibe
Misirê û dê çend salî ji qiralê ba-
kur ve dest bikişîne. 9 Û dê ew ê
jî were welatê qiralê başûr, lê belê
dê vegere axên xwe.
10 Û dê lawên wî şer bikin û dê
artêşek zehf mezin bicivînin û dê
ew ê were û êrîş bike û derbas
bibe û dê şunda vegerin û dê heta
bircên wî cengê bikin. 11 Û dê
qiralê başûrê bikeribe û derkeve
û dê bi wî re, bi qiralê bakur re
cengê bike û dê ew jî artêşek me-
zin derxîne û dê artêş bi destê wî
ve bête dayîn. 12 Û dema artêş ji
holê ve bête rakirin, dê dilê wî bi-
nepixe û dê bi deh hezaran mirovî
bixîne; lê belê dê bi ser ve nekeve.
13 Û dê qiralê bakurê dîsa were û
artêşek ji ya yekem hîn jî mezintir
derxîne û paşî wextan, paşî salan
dê bi artêşek mezin û zehf bi ama-
dekarî were. 14 Û dê wan wextan
gellekan li dijî qiralê başûr ve
bisekinin; zordestên netewa te jî,
bona xewn û xeyal bête cîh dê ra-
bin; lê belê dê bikevin. 15 Û dê
qiralê bakurê were û dê meterîsê
deyne û bajarekî bi dîwar bistî-
ne û hêzên başûr û netewa wî ya
bijartî dê nikaribin di berxwe de
bidin û dê bona berxwedanê hêz
tune be. 16 Û yê ku li dijî wî rabe,
dê li gor xwesteka xwe bike û li
dijî wî tu kes nikare ku bisekine
û dê li welatê xweşik bisekine û
dê helaq di destê wî de be. 17 Û
bona bi hemû hêza xwe yî qira-
letiyê ve were dê berê xwe bide
û dê bi wî re şertên pevkirinê he-
bin û dê ew ê vana bike û bona ku
welêt helaq bike, dê ew ê ji qîzên
pîrekên xwe qîzekê bide wî; lê
belê dê qîz nesekine û dê nebe ya
wî. 18 Paşî wê dê berê xwe bide
giraveyan û dê gellekan bistîne; lê
belê dê serokek dawiya heqaretên
ku ew dike bîne; dê heqareta wî jî
vegerîne ser serê wî. 19 Dê wecê
xwe bizivirîne bircên welatê xwe;
lê belê dê tilpekî bibe û bikeve û
dê êdî neyê dîtin.

20 Û dê li dêvila wî kesek derkeve
ku, dê ji warê ku mezinahiya qira-
letiya wî lê ye kesê ku bi zorê ner-
xê bide hev bişîne; lê belê mîna
ku ne di kerb û cengê de be, dê di
hundirê çend rojî de bişkê. 21 Û
zilamekî şerefa qiraletiyê nedane
wî û biçûk hatiye dîtin, dê derke-
ve cîhê wî; lê belê dê di dema ew-
lekariyê de were û dê bi çaplûsî
kirinê qiraletiyê bi dest ve bixe.
22 Û dê li quwetên ku êrîş kirinê
ji ber wî ve êrîşê bikin û dê bişkên
û dê rêberê peymanê jî bişkê.
23 Û paşî peymana ku bi wî re
hatiye kirin, dê bi fenekiyê bike û
dê derkeve û dê bi gelekî biçûk ve
xwurt bibe. 24 Bi ser cîhên herî
qenc yên welêt ve dê di dema
ewlekariyê de werin û dê tiştê
ku ji aliyê bapîrên xwe û bapîrên
bapîrên xwe ve nehatine kirin
bike; dê di nav wan de bi malê
talan û yexmê, serwetê[1] belaw
bike û dê demekê li dijî bircan
dek û dolabên xwe deyne. 25 Û
dê bi artêşekî mezin li dijî qiralê
başûr hêza xwe û dilê xwe hişyar
bike û dê qiralê başûrê bi artêşekî
mezin û zehf xwurt e rabe cengê;
lê belê dê nesekine; ji ber ku dê
li dijî wî dek û dolaban deynin.
26 Yên xwarina wî yî xweşik
xwarine jî wî bişikînin û dê artêşa
wî belav bibe û gellekan dê bên
lêxistin û bikevin. 27 Lê ev her
du qiral jî, dê dilên wan pêşniyara
xerabiyê bikin û dê di sifreyekê
de derewan bibêjin; lê belê dê
ev nesekine, ji ber ku dawî dê di
dema eşkere de be.
28 Û dê bi gellekî malan vege-
re welatê xwe û dê dilê wî li dijî
peymana pîroz be û dê xwesteka
xwe bike û vegere welatê xwe.
29 Di demekî eşkere de dê vegere
û here başûrê; lê belê dawî dê ne
mîna destpêkê be. 30 Ji ber ku dê
li dijî wî keştiyên Kîttîmê werin û
dê newêre û vegere û li dijî pey-
mana pîroz dê bi xezebê bikeve
û xwesteka xwe bike û dê şunda
vegere û ji yên ku peymana pîroz
berdane re hurmetê bike. 31 Û ji
aliyê wî ve dê hêz rabin û perest-
gehê, bircê xera bikin û pêşkêşiya
ku her timî tête şewitandin, dê ra-
kin û tiştê mekrûh yê ku xera dike
dê ava bikin. 32 Û qiralê bakurê
dê bi çaplûsî kirinê yên ku pey-
manê kirêtî dikin çewt bike; lê
belê netewa ku bi xwedayê xwe
ve dizane, dê bi hemûya hêza
xwe li dijî wî bisekine. 33 Û dê
zilamên netewê yên fêhmkarî ne,
hînî gellekan bikin; lê belê bi ro-
jan dê bi şûr û bi pêt û bi sirgûnî û
bi şelandinê bikevin. 34 Û dema
ew bikevin, dê bîskek alîkariyê
bibînin; lê belê dê gellekan çaplû-
siyê bikin û bi wan re yek bibin.
35 Û heta dema dawiyê bona ku

[1] Mal, hebûnî.

xwe safî bikin, paqij bikin û bêleke bikin, hinekên ku bi fêhmkarî ne, dê bikevin; ji ber ku dê dîsa jî dawî di wexta ku hatiye eşkere kirin de tê.
36 Û dê qiral li gor xwesteka xwe bike û dê xwe bilindtir bike û dê xwe ji her îlahî ve mezintir bike û dê li dijî Xwedayên îlahan tiştên ku şaş dikin bibêje û heta ku xezeb temam bibe, dê kar qenc here; ji ber ku tiştê hatiye darazî kirin dê bête kirin. 37 Ne ji îlahên bapîrê xwe re, ne jî ji yê ku pîrek bêriya wî dikin re, dê ji tu îlahî re hurmetê neke; ji ber ku dê ew xwe ji hemûyan mezintir bike. 38 Lê belê dê li dêvila wî mezintiyê bide îlahê bircan û dê bi zêr û zîv û kevirên bi qîmet re û bi tiştên xweşik ve mezinahiyê bide îlahekî ku bapîrên wî pê nizanin. 39 Û dê bi alîkariya îlahekî biyan bi bircên herî zexm[1] ve mijûl bibe; dê gellekî mezintiyê bide her kesê ku vî îlahî dinasin û dê wan bi ser gellekan bike serwer û wekî ku bi berdêl be, dê welêt di nav wan de par bike.
40 Û di wexta dawiyê de dê qiralê başûrê bi wî re şer bike û li dijî wî qiralê bakurê bi erebeyên cengê û bi siwaran û bi gellekî keştiyan mîna bahozê[2] were û dê bikeve welatan û dê pêlê bike û here. 41 Dê bikeve welatê xweşik jî û dê gellek welat bikevin; lê belê vana, Edom û Moab û pêşhatiyên lawên Ammon, dê ji destê wî ve xelas bibin. 42 Dê destê xwe jî bi ser welatan ve dirêj bike û dê warê Misirê xelas nebe. 43 Û dê ji xezîneyên zêr û zîv re û ji hemû tiştên biqîmet yên Misirê re bibe serwer û dê Lûbiyan û Habeşiyan li pêy wî bimeşin. 44 Lê belê dê agahiyên ji rojhilatê û ji bakur tên, wî bikesirînin û bona gellekan helaq bike û bona bitûmî û bitûmî tune bike, dê bi kerbekî mezin derkeve rê. 45 Û dê di navbera behrê û çiyayê pîroz de çadirên xwe yî qesrê deyne; lê belê dê bigihêje dawiya xwe û dê kesekî ku alîkariyê jê re bike, tune be.

*Tengasiya mezin ya di dawiya Demê de û xelasiya Îsraêlê*

Met 24,21-22; Pey 10-19

12 Û serokê mezin, Mikaîl, yê li benda lawên netewa te ye, dê wê çaxê rabe û dê wextekî tengasiyê ya ji cergî bûne netewe heta wê çaxê çênebûye dê bibe û wê wextê dê netewa te, her kesê ku navê wan di pirtûkê de nivîsandî ne, dê xelas bibin. 2 Û gellekên ku di axa erdê de radikevin, vana dê ji jiyana abadîn re û wana dê ji keriha[3] abadîn re hişyar bibin.

1 Xwurt, bihêz.
2 Tofanê.
3 Nefrîn, nefret.

3 Û yê fêhmkarî mîna şewla sêla
ezmanî, yê gellekan vergerandine
rastiyê jî mîna sitêrkan, abadîn û
her timî dê bibiriqin. 4 Lê belê
tu, ya Danîêl, heta wexta dawînê
van gotinan veşêre û pirtûkê mohr
bike; dê gellek zilaman lêkolînê
bikin û dê zanîn zêde bibe.
5 Û ez, Danîêl, nihêrtim û a vay,
du zilamên wekî din, yek li vê
qeraxa çem û yê din li qeraxa dinî
çem sekinîbûn. 6 Û yekî, ji zilamê
ku kitanan li xwe kiriye û li ser
avên çemê sekiniye re got: Çiqas
wext ji dawiya van nuwazeyan
re hene? 7 Û zilamê ku kitanan li
xwe kiriye û li ser avên çemê seki-
niye bihîstim; destê xwe yî rastê û
destê xwe yî çepê berbi ezmanan
ve rakir û bona mafê Yê ku abadîn
Zindî ye sondê xwar: Dê wextek
û wextan û nîv wext[1] bin û dema
şikandina quweta netewa pîroz
biqedînin, dê van tiştan hemû bi-
qedin! 8 Û min ev bihîst[2], lê belê
fêhm nekirim û gotim: Efendiyê
min, dê dawiya vêya çi bibe? 9 Û
got: Here, Danîêl, ji ber ku heta
wexta dawînê van gotinan veşartî
ne û mohr kirî ne. 10 Dê gellekan
xwe paqij bikin û xwe bêleke bikin
û dê bên safî kirin; lê belê dê yên
xerab xerabiyê bikin û dê tu kesî ji
yên xeraban e, fêhm nekin; lê belê
yên bi fêhmkarî ne, dê fêhm bikin.
11 Û ji roja ku pêşkêşiya her timî
tête şewitandin bête rakirin û roja
ku tiştê mekrûh yê xera dike bête
çikandin[3], dê hezar û du sed û nod
roj bibe. 12 Xwezî li yê ku di ber-
xwe de bide û bigihêje roja hezar
û sê sed û sîh û pêncan! 13 Lê belê
tu, heta ku bibe dawîn here; ji ber
ku tuyê bigihêje rehetiyê û di da-
wiya rojan de tuyê ji bo stendina
mêrasa[4] xwe hişyar be!

---

1 Wextek û du wextan û nîv wext, an jî: Sê sal û nîv.
2 An jî: Min ev tiştên ku zilam gotin, bihîstin.
3 An jî: Bête danîn.
4 An jî: Xelat.

# HOŞEYA

*Pêşgotin*

Samîriye ya ku paytexta qiraletiya bakurê Îsraêlê ye û bi navê Efrayîm jî tête nasîn B.Z. di sala 722'an de kete destê Asûriyan. Peyxamber Hoşeya, di rojên tengasî yên berî van bûyeran de derket holê. Bi taybetî jî balkişandina mijarên pûtperestî û bêdilsoziya ji Xwedê re anî ziman. Ji Xwedê cihêbûn û ji îlahên din re peristina gelê Îsraêlê, bi zinê re dike yek. Herweha Hoşeya, ji aliyê Xwedê ve bona têkiliyên di navbera Xwedê û gelê Îsraêlê de ne pêşkêş bike, ji bo bi pîrekek zinakar re bizewice tête birêve kirin. Mîna ku Gomera jina wî jê re dilsoziyê nake, gelê Xwedê jî bi Xudan ve dilsoz namîne. Ji ber vê yekê dê Xwedê Îsraêlê bi ceza bike. Lê belê ya dawîn hezkirina Xwedê ya her timî dê ji nû ve gelê xwe qezenc bike, têkiliyên xwe yî bi wan re serrast bike. Ev hezkirin di ayeta 11:8'an de bi vî awayî tê daxuyanî kirin: Ma ez ê çawa dev ji te berdim, ya Efrayîm; ez ê çawa te bidim dest, ya Îsraêl? Ya ku ji Adamayê re kirime, ez ê çawa bi te bikim? Ez ê te çawa vegerînim Seboyîmê? Dilê min di hundirê min de hate guherîn, hestên minî li berketinê gişt pev re sor bûn.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-3:5 | Zewac û malbata Hoşeya |
| 4:1-13:16 | Belavokên li dijî Îsraêliyan |
| 4:1-9 | Belavoka tobe û wadê |

1 Di rojên qiralên Cihûdayê
Ûziya, Yotam, Ahaz û Hîzkiya
de û di rojên qiralê Îsraêlê Yero-
beamê lawê Yehoaş de, gotina
XUDAN, ya ku ji Hoşeyayê lawê
Beerî re hatiye.

*Pîrek û Zarokên Hoşeya*

2 Gava XUDAN bi navdîtiya
Hoşeya ve dest bi axaftinê kir,
XUDAN ji wî re ûsa got: Here, bi
pîrekek xerab re bizewice û bila ji
wê, zarokên te yî zinê çêbibin. Ji

ber ku gelê welêt ji XUDAN ve
diqetin û zehf zinê dikin!
3 Û bi vî avayî, ew çû û bi Go-
mera qîza Dîblayîm ve zewicî. Û
pîrek ducanî bû û lawekî jê re anî
dinê. 4 Û XUDAN ji wî re got:
Navê Yîzreêl[1] li lawik bike! Ji ber
ku pirr derbas nebe, ez ê tola xwî-
na ku li Yîzreêlê hatiye rijandin
ji nîjada Yehû ve bistînim. Û ez
ê dawiya qiraletiya Îsraêlê bînim!
5 Û wê rojê wusa bibe ku, ez ê di
newala Yîzreêlê de kevana Îsraêlê
bişkînim.
6 Û pîrek dîsa ducanî bû û qîzekê
anî dinê. Û wî (XUDAN) ji Hoşeya
re got: Navê Lo-Rûhama[2] lê bike!
Ji ber ku êdî dê heyfa min li nîjada
Îsraêlê neyê ku ez li wan biborînim!
7 Lê dê heyfa min li nîjada Cihûda
ve bê. Û ez ê wan xelas bikim, lê
belê ne bi navdîtiya hesp û şûr û
kevan û şer û siwaran, bi navdîtiya
Xwedanê wan XUDAN.
8 Û dema pîrekê, Lo-Rûhama ji
şîr ve birrî, dîsa ducanî bû û la-
wekî anî dinê. 9 Û wî (XUDAN)
got: Navê Lo-Ammî[3] lê bike! Ji
ber ku hûn ne gelê min in û ez jî
ne Xwedayê we me! 10 Lê dîsa
jî dê hejmara lawên Îsraêlê, mîna
qûma behrê nayê jimartin û pîvan-
din bibe. Û wusa bibe ku, li cîhê ji
wan re: Hûn ne gelê min in dihat
gotin, dê: Hûn zarokên Xwedayê
zindî ne, bê gotin. 11 Û dê lawên
Cihûda û lawên Îsraêlê cîhekî bi-
civin. Û serokekî deynin serê xwe.
Û dê ji welat derkevin. Ji ber ku dê
roja Yîzreêlê, bibe rojekî mezin.

*Îsraêla nedilsozî*

2 Bi gotina: Gelê min bangî
birayên xwe, bi gotina: Yên
gîhaştine dilovaniyê jî bangî
xwuşkên xwe bikin.
2 Bipekin bi dayika xwe re, bipe-
kin! ji ber ku êdî ew ne jina min
e û ez jî ne zilamê wê me. Bila
fahşetiya ku ji wecê wê ve diheri-
ke û ji paşla xwe zinêyan bavêje.
3 Ya na ez ê wê şût û tazî rût bikim,
mîna roja ku ji dayikê bûyî bikim
û vergerînim çol û erdê beyar û ji
tîbûnê bikujim.
4 Û dê heyfa min li zarokên wê ve
neyê, ji ber ku ew zarokên zinê ne.
5 Ji ber ku dayika wan zinê kir,
pîreka ku bi wan ve ducanî bû, re-
zîltiyê kir; ji ber: Ez ê li pêy dos-
tikên xwe herim got. Yê ku nanê
min û ava min, hiriya min û ki-
tana min, zeyta min û xemra min
didin, ew in!
6 Ji ber vê yekê, a vay, ez ê çîta[4]
kelemî bikişînim rêya wê û bona

[1] Yîzreêl, tê mana: Dê Xwedê biçîne, an jî: Dê Xwedê belav bike.
[2] Lo-Rûhema, tê mana: Nagihêje dilovaniyê.
[3] Lo-Ammî tê mana: Ne gelê min î.
[4] Çeper.

ku rêyên xwe nebînî, ez ê dîwar
li ber wê lê bikim. 7 Û dê bi pêy
dostikên xwe bikevî, lê belê nikari-
be bigihêjî wan û dê li wan bigerî,
lê belê nikaribe wan bibînî. Û wê
gavê dê bibêje: Ez vegerim zilamê
xwe yî pêşîn. Ji ber ku halê minî
wî çaxî, ji yê niha qenctir bû!
8 Lê belê wê fêhm nekir yê ku
zad, xemra nû û zeytê dide wê û
yê zêrên ku bona Baal xerc dike
bi zêdeyî dide wê ez im. 9 Bo vê
yekê, di dema wê de ez ê zadê
xwe û di demsala wê de ez ê xem-
ra xwe yî teze jê bistînim; rîs û ki-
tanê xwe yên ku bedena wê yî tazî
duxumîne bikişînim û rahêlim.
10 Belê, ez ê li ber dostikên wê
şermezariya wê derxînim holê û
dê tu kes nikaribe wê ji destê min
ve xelas bike. 11 Û ez ê dawiyê bi-
dim hemû kêfxweşiyên wê, cejnên
wê û merasimên wê yên heyva nû
û rojên wê yên Sebtê[1] û hemûyên
cejnên wê. 12 Û ez ê mêwên wê û
darên hêjîrên wê wêran bikim, ji
bo yên ku wê digot: Vana heqên
min yên ku dostikên min dayîne
min in. Û ez ê wan vergerînim
daristanê û dê ji heywanên bejî
re bibin xwarin. 13 Û ez ê wan bi
ceza bikim, bona rojên ku buxurê
ji Baalan re şewitandibû; bi guhar
û bi mucewherê gerdenê ve xe-
milandîbû û li pêy dostikên xwe
ketibû û min ji bîr kiribû; dibêje
XUDAN.
14 A vay, bo vê yekê ez ê wê qa-
nih bikim û bibim çolê û ji dilê wê
re bi hevaltî biaxifim. 15 Û ez ê li
wir rezên wê bidim wê û newala
Akorê[2] jê re bikim deriyê hêviyê.
Û mîna ku di roja ciwantiya wê
de û mîna rojên ku ji Misirê ve
derketibû, dê murxan bibêjî.
16 Û dê ew roj were! dibêje XU-
DAN.
Tuyê ji min re bibêjî: Mêrê min û
êdî tuyê ji min re nebêjî: Efendiyê
min[3]. 17 Û ez ê ji devê wê navê
Baalan paqij bikim û dê êdî navên
wan carekî din jî di bîr de neyê.
18 Û ez ê wê rojê bi heywanên
li beyar û bi civîkên li ezman û
zindiyên di axê de dijîn û bona
gelê xwe peymanê çê bikim û ez
ê ji welêt kevanê û şûr bişkînim
û şer rakim û wan di nava ewle-
kariyê de razînim. 19 Û ez ê te
heta bêdawîbûnê ji xwe re bikim
destgirtî, belê, ez ê te bi rastî û bi
dadî û bi qencî û bi dilovaniyê ji
xwe re bikim destgirti. 20 Û ez
ê bi dilsozî te ji xwe re destgirtî
bikim[4] û tuyê XUDAN binase.
21 Û wê rojê wusa bibe ku, ez ê

---

1 Şabat.
2 Akor, tê mana: Tengasiyê.
3 Efendiyê min: Bi Îbranîtî Baalim. Li vir hunerek gotinî hatiye kirin, ji ber ku Baal him navê îla-hekî û him jî tê mana mêr, efendî jî.
4 Nîşanî bikim.

bersivê bidim, dibêje XUDAN:
Ez ê bersivê bidim ezmanan û ew
ê jî bersivê bidin erdê 22 û erd jî
dê bersivê bide zad, xemra teze
û zeytê û dê ew ê jî bersivê bidin
Yîzreêlê.
23 Û ez ê li welêt, bona xwe wê
biçînim û dê heyfa min ji yê ku jê
re gotibûm: Dê negihêje dilova-
niyê bê û ji yê ku jê re gotibûm:
Ne gelê min î re, ez ê bibêjim: Tu
gelê min î! Dê ew jî ji min re bi-
bêje: Tu Xwedayê min î!

*Hoşeya û Pîreka Bêwefa*

3 Û XUDAN ji min re got: Çawa
ku Îsraêliyan berê xwe didin
îlahên din û dil didin bastêqên ti-
riyan[1], lê dîsa jî XUDAN çawa ji
wan hez dike, tu jî dîsa here û ji wê
pîreka hez bike, ya ji aliyê dostikê
xwe ve tê hezkirin û zinê dike!
2 Û bi vî awayî, min wê bi panz-
deh şekel zîv[2] bi homerek û lete-
kek cehî[3] ji xwe re stend. 3 Û ji wê
re: Tuyê di demekî dirêj de bi min
re bijî gotim. Tuyê zinê meke û bi
zilamekî din re jî hevaltiyê meke;
ez ê jî ji te re ûsa bikim! 4 Ji ber
ku dê lawên Îsraêl di demek dirêj
de bêyî qiral û serok û bêyî qur-
ban û bêyî kevirê çikandî û bêyî
efod û terafîm bijîn. 5 Dawiyê dê
lawên Îsraêl vegerin û li XUDAN
Xwedayê xwe û li qiralên xwe
Dawid bigerin. Û di rojên dawîn
de bi tirs dê vegerin û berî bidin
XUDAN û qenciya wî.

*XUDAN Îsraêlê diazirîne*

4 Ya lawên Îsraêl, gotina XU-
DAN guhdarî bikin!
Ji ber ku doza XUDAN heye bi
kesên ku li vî-welatî dijîne re: Ji
ber ku, di welêt de rastî tune bûye
û dilsozî tune bûye û zanîna Xwe-
dê tune bûye. 2 Nalet û derew û
mêrkuştin û dizî û zinê cîhên her
tiştî girtine. Zordestiyê dikin û
xwînê li ser xwînê dirijînin. 3 Bo
vê yekê, welat şînê dikişîne û her
kesên ku li wir dijîn, diqedin, hey-
wanên li beyar, civîkên li ezman û
masiyên di behrê de. 4 Lê belê bila
tu kes bi kesî re nekeve keftûleftê
û tu kes, kesî sûcdar neke! Ji ber
ku gelê te, mîna yên ku bi kahîn re
dikevin keftûleftê ye ne! 5 Û tuyê
di rojê de tilpekî bibe û şev jî pey-
xamber tevî te tilpekî bibe û ez ê
dayika te helaq bikim.
6 Gelê min ji nezaniyê tune bû.
Ji ber ku te zanînê red kir, ez ê jî
te red bikim, bona ku tu ji min re
êdî kahîntiyê neke. Û ji ber ku te
zagona Xwedayê xwe ji bîr kiri-
ye: Ez ê jî zarokên te ji bîr bikim!
7 Her ku ew zêde dibûn, hîn jî

[1] Bastêqên tiriyan: Ji pûtan re dihatin pêşkêş kirin.
[2] Panzdeh şekel zîv: Nêzîkî 170 gram.
[3] Homerek û letek ceh: Nêzîkî 165 giram.

zêde li dijî min gunehan kirin:
Ez ê mezinahiya wan vergerînim
şermezariyê. 8 Bi gunehên[1] gelê
min xwe xwedî dikin û dixwazin
ku ew sûcan bikin.
9 Û yên ku hatine serê gelê min
dê werin serê kahînan jî û ji ber
rêya ku girtine, ez ê wan bi ceza
bikim û ez ê berdêla kirinên wan
bidim wan. 10 Û dê bixwin, lê
belê têr nebin; dê zinê bikin, lê
belê zêde nebin; ji ber ku dev ji
guhdarî kirina XUDAN berdan.
11 Zinê, xemra teze û kevin hişê
mirov ji serê wî dibin.
12 Gelê min, bi senemê darînî ve
dişêwire û ji çoyê wî bersivê dis-
tîne; ji ber ku ruhê zinê wan ji rê
derxistin[2], ji Xwedayê xwe qeti-
yan û zinê kirin.
13 Li serê çiyan qurbanê jêdikin
û li ser serê giran, di bin darên
çilo û hewr[3] û kezwanê de buxurê
dişewitînin, ji ber ku siyên wan
xweşik in. Bo vê yekê qîzên we
fahîşetiyê dikin û bûkên we zinê
dikin. 14 Ez ê gava ku fahîşetiyê
bikin, qîzên we û gava ku zinê
bikin, bûkên we biceza nekim. Ji
ber ku zilamên we bi fahîşeyan ve
dilîzin û di perestgeha pûtan de û
tevî yên ku fuhûşê dikin qurban
jêdikin. Û dê gelê bêfêhmkarî
mehf bibe. 15 Ya Îsraêl, tu zinê
bikî jî, balo bila Cihûda sûcan
meke! Û neçin Gîlgalê û derneke-
vin Beyt-Avenê[4]. Û bi gotina:
Bona heqê XUDANê ku zindî ye
sondê nexwin! 16 Ji ber ku Îsraêl,
mîna çêlekek bi inyad, inyadê kir;
niha dê XUDAN wan mîna berxi-
ka di cihê fireh de biçêrînî?
17 Efrayîm bi pûtên xwe ve girt,
dê berde! 18 Meya[5] wan tirş bû,
her tim zinê dikin; şermezarî, tiştê
ku serokên wan gellekî jê hez di-
kin e. 19 Ba, wan bi bazikên xwe
ve pêça û dê ji ber qurbanên xwe
şermezar bibin.

*Îsraêl tobe nake*

5 Ya kahînno, vêya bibihîzin!
Û ya mala Îsraêl, bi baldayî
guhdarî bikin! Û guh bidinê, ya
mala qiral! Ji ber ku dê ev darazî,
bona we bê kirin. Ji ber ku hûn li
Mîspayê bûn dafikek û hûn bûn
torek ku li Taborê ve hatiye raxis-
tin.
2 Û yên ku serî hildane, her
ku diçe har dibin. Lê belê ez ê
hemûyên wan bînim ser rê.
3 Ez Efrayîm dinasim û Îsraêl,
bona min veşartî nîne; ji ber ku

---

1 Bi gunehên...: Vê gotina Îbranîtî him tê mana guneh û him jî tê mana pêşkêşiya gunehê, binêrin (Lêwiyiyan 6:25-30).

2 Gîlgal û Beyt Avên: Cîhên peristinê bûn, lê belê van peristgehan ji aliyê Xwedê ve nedihatin qebûl kirin.

3 Spîndar.

4 Araq.

5 Vexurk, alkol.

hîn te nû zinê kir, ya Efrayîm; Îs-
raêl xwe gemarî kir.
4 Karên wan, destûrê nade ku
vegerin Xwedayê xwe; ji ber ku
ruhê zinê di hundirê wan de heye
û XUDAN nas nakin. 5 Û xirûra
Îsraêlê, li dijî wecê wê şahdeyiyê
dike û di nava sûc de tilpekî di-
bin, Îsraêl û Efrayîm, Cihûda jî bi
wan re tilpekî dibe. 6 Dê bi dewar
û gayên xwe ve herin ku li XU-
DAN bigerin, lê belê dê nikaribin
bibînin: Ji ber ku ew ji wan ve
dûr ket. 7 Li dijî XUDAN xayin-
tiyê kirin, ji ber ku ew bûn bavê
zarokên biyanî; niha dê şahiyên
heyva nû wan û zeviyên wan bi-
xwe û biqedîne.
8 Li Gîbayê boriyê, li Ramayê
borîjenê bikutînin; li Beyt-Avenê:
Banga hêzdar bikin; neyar li pêy
te ye, ya Benyamîn!
9 Di roja pekandinê de, dê Efrayîm
rastî têkçûnê bibe; ez biryara xwe
ji eşîrên Îsraêlê re digihînim.
10 Serokên Cihûda, mîna yên ku
cihê kevirên sînorê diguherînin;
ez ê xezeba xwe, mîna avê bi ser
wan ve birijînim.
11 Efrayîm, zordestiyê dît, li ber
daraziyê eciqî[1], ji ber ku bi xwes-
tinê ve, li pêy emirên mirovan
ket.
12 Û ez ê ji bo Efrayîm bibim
mîna bizûzk û ji bo mala Cihûda
jî bibim mîna kufikê. 13 Û gava
Efrayîm nexweşiya xwe, Cihûda
jî birîna xwe dîtin, Efrayîm çû
Asûrê û ji qiral Yarêb ve alîkari-
yê xwest. Lê belê ew nikare şîfê
bi we de û nikare birîna we baş
bike.
14 Ji ber ku ez ê ji bo Efrayîm
bibim mîna şêrekî û ji bo mala
Cihûda bibim·mîna şêrekî ciwan.
Ez, ez ê wan perçe bikim, rahêlim
û bibim û dê yekî ku xelas bike
dernekeve. 15 Ez ê vegerim cîhê
xwe, heta ku ew sûcên xwe qebûl
bikin û li wecê min bigerin ez ê
li wir bimînim. Gava bikevin ten-
gasiyê, dê ew ê bi xîret li min bi-
gerin.

*Vegerin XUDAN*

6 Werin û em vegerin XUDAN;
ji ber ku wî me perçe kir û dê
ew ê me baş bike. Wî me birîndar
kir û dê ew ê birîna me bipêçe!
2 Ew ê dê piştî du rojên din me bi-
vejîne, roja sêwemîn dê me rake
ser pêlan û em ê di hizûra wî de
bijîn.
3 Werin, em XUDAN binasin,
belê, werin em bona nasîna
wî xîretê bikin! Dê ew ê mîna
berbangê, bêşaşbûn derkeve û
mîna baranê, mîna barana biharê,
ya ku avdana erdan dike, dê ji bo
me were!
4 Ya Efrayîm, ma ez çi ji te re
bikim? Ya Cihûda, ma ez çi ji te re

1 Tahdê dît.

bikim? Ji ber ku qenciya we, mîna
mija sibehê ye. Û mîna xunava ku
bi zûyî dibuhure û diçe ye! 5 Bo
vê yekê, min we bi navdîtiya pey-
xamberan ve parî parî hincirand,
bi gotinên devê xwe ve kuştin û
daraziyên min mîna birûskan di-
biriqin. 6 Ji ber ku ez ne ji qûr-
banê, lê ji dilsoziyê ve hez dikim,
ji pêşkêşiyên şewitandinê zêdetir,
dixwazim ku hûn zanyariya Xwe-
dê binasin.
7 Lê belê ew, mîna Adem, ji pey-
manê wê de çûn, li wir xayîntiyê
bi min re kirin. 8 Gîlead, bajarê
kesên ku xerabiyê dikine yî, bi
şopên xwînê ve tijî ye. 9 Û çeteya
rêbiran çawa dikevin kemînê, ta-
ximê kahînan jî wusa ye; li rêya
Şekemê zilam dikujin, belê, rezîl-
tiyê dikin.
10 Di mala Îsraêl de, tiştekî tir-
sehêz dîtim. Fahşetiya Efrayîm
li wê derê ye, Îsraêl xwe gemarî
kir.
11 Ya Cihûda, dema sirgûnên gelê
xwe şunda anîm, bona te jî rojekî
çinînê hate danîn!

7 Dema ku bixwazim şîfê bidim
Îsraêl, sûcên Efrayîm û xera-
biyên Samîriyê derdikevin holê.
Ji ber ku fenekiyê dikin û diz di-
kevin malan û li derve ji çeteyên
rêbiran tazîkirinê dikin. 2 Û çi
heye di dilê xwe de nafikirin ku,
ez hemû xerabiyên wan ji bîr na-
kim. Niha karên wan[1] dora wan
girtin, li ber wecê min in!
3 Qiral bi xerabiyên xwe û serokan
bi derewên xwe ve kêfxweş dikin.
4 Hemûyên zinêkiran, mîna firna
heta ku hevîrê hatiye sitirandin
tirş bibe, firnevan hewcetê nabîne
ku li hev bixe sor kirî ne.
5 Di roja şahiya qiralê me de,
serokan ji agirê xemrê ve xwe
nexweş kirin, qiral jî bi qerfo-
kan re dest dan hev. 6 Ji ber ku
dilên wan, mîna firnê ne, bi dek
û dolavan nêzîkî wî dibin, hêrsên
wan di dizîka de dişewite. Dema
dibe sibeh, mîna agirê bi pêt dibi-
riqe. 7 Hemû mîna firnekê sorkirî
ne û serwerên xwe dadiqurtînin.
Hemû qiralên wan ketin, tu kes di
nav wan de bona alîkariyê bangî
min nake.
8 Efrayîm tevî gelên din dibe,
Efrayîm mîna nanê ku nehati-
ye qulupandinê ye. 9 Yên biyan
hêza wî xwarin û hayê wî jê nîne;
porên serê wî jî sipî bûn û haya
wî jê nîne.
10 Û xirûra Îsraêl, li dijî wî
şahdeyiyê jê re dike, lê li ber vana
hemûyan dîsa jî venagerin min,
XUDAN Xwedayê xwe û li min
nagerin. 11 Efrayîm, çavzîq, mîna
kevokek bêaqil bû, an bona alîka-
riyê bangî Misirê dikin, an jî diçin
Asûrê. 12 Dema herin, ez ê tora

1 An jî: Gunehên wan.

xwe bavêjim ser wan û wan mîna
civîkên li ezmana ne, daxînim
xwarê; mîna ku ji civakên wan
re hatiye têgîhandin, ez ê wan
perwerde bikim[1]. 13 Wey li halê
wan! ji ber ku ji min ve dûr ketin.
Dê bêtar were serên wan, ji ber ku
li dijî min rabûn! Û ez dixwazim
ku wan bi fîdyeyê xelas bikim,
lê belê wan li dijî min derewan
gotin. 14 Û ji dil ve bangî min
nekirin, li ser livînên xwe diûrin.
Bona zad û xemra teze dicivin û
li dijî min asê dibin. 15 Û min pi-
yên wan perwerde kir, quwetê da
wan, lê belê ew li dijî min xerabi-
yê ava dikin.
16 Ew vedigerin, lê belê ne li yê
Bilind; ew mîna kevanek biqisûr
in[2]. Ji ber zimanên wanî bêar, dê
serokên wan bi şûran ve bikevin.
Ji bo vê sedemê, dê li Misirê bike-
vin rewşekî pêkenokiyê!

*Xwedê Pûtperestan biceza dike*

8 Bona borî kutandinê amade
bibe! Mîna qertelekî ew li ser
mala XUDAN digere; ji ber ku
wan li gor peymanê nekirin, li dijî
zagona min xayîntî kirin. 2 Ya
Xwedayê me, em Îsraêl te dinasin!
dê feryadê ji min re bikin.
3 Îsraêl ya qenc ji xwe avêt, dê
neyar bera wan bide! 4 Wan qi-
ralan bijartin[3], lê ji min nepirsîn,
bêyî gumana min serokan bijartin,
bi zêr û zîvên xwe, pûtên ku rê li
têkçûna wan vedikin çê kirin.
5 Ya Samîriye, wî pûtê te yê go-
likî avêt! Hêrsa min li dijî we sor
dibe! Ma hûn ê heta kengê paqij
nebin? 6 Ji ber ku ev kar jî ji Îs-
raêlê ye; hostayekê wê çêkir û ew
ne Xwedê ye, dê pûtê golik yê
Samîriyê bê perçe kirin! 7 Ji ber
yê ku ba biçîne, dê bahozê dirûnî-
ne[4]. Genimê ku serî nede arvan
nade. Ger bide jî, dê yên biyan wê
daqurtînin.
8 Îsraêl hate daqurtandin, ew niha
di nava neteweyan de mîna qabek
ku kes wê naecibîne ye. 9 Ji ber
ku mîna kerê bejî, yê ku tena xwe
digere çûn Asûrê. Lê Efrayîm dos-
tikên mişekar girt. 10 Ger di nav
neteweyan de dostikan bigirin jî,
niha ez ê wan li ba hev bicivînim û
ji ber ku kêm dibin, di bin barê qi-
ralê serokên xwurt de. 11 Ji ber ku
Efrayîm, bona pêşkêşiya gunehê
pêşkêş bike, gellek pêşkêşîgehan
ava kir û van pêşkêşîgehan bûn se-
dema gunehkirina wan. 12 Min deh
hezar tiştên di zagona xwe de, bona
wan nivîsand, çi heye ku wan vana
ecêb dîtin. 13 Ger em bên qurbanên
ku pêşkêşî min kirine, goşt dikin
qurban û bi xwe wî dixwin. Lê belê

1 An jî: Bînim rê.
2 An jî: Xapînok in.
3 An jî: Wezîfedar kirin.
4 Hilde.

XUDAN wan qebûl nake. Niha dê
sûcên wan di bîra xwe de bîne û ji
ber gunehên wan, dê wan bi ceza
bike; dê ew ê vegerin Misirê. 14 Ji
ber ku Îsraêl, Afirkirê xwe ji bîr kir
û qesran ava kir û Cihûda bajarên
xwe yî bi dîwar zêde kir; lê belê ez
ê agir bi ser bajarên wî ve bişînim û
dê qesrên wî bixwe û biqedîne.

*Îsraêl tête cezakirin*

9 Ya Îsraêl, mîna gelên din
kêfxweş nebe; necoşe! Ji ber
ku te bêwefatiyê ji Xwedayê xwe
re kir û zinê kir, te di hemûya
cîhên bênderên geniman de dil
da qezenca zinê. 2 Lê belê cîhê
bênderê, fiçiya xemrê dê wan têr
neke û dê hêviya wanî xemra teze
vala derkeve. 3 Dê ew nikaribin
li warê XUDAN ve bisekinin, lê
Efrayîm vegere Misirê û li Asûrê
tiştên ku gemarî tên hesibandin
dê bixwin. 4 Dê pêşkêşiyên xem-
rê ji XUDAN re nerijînin û qur-
banên wî nikaribin wî şa bikin.
Dê qurbanên wî vegerin xwarina
şînê; hemûyên ku wan bixwin, dê
gemarî bên hesibandin. Ji ber ku
xwarina wan, dê tenê zikê wan têr
bike, dê nekeve Perestgeha XU-
DAN!
5 Ma hûn ê di roja cejnê de û di
roja cejna XUDAN de çi bikin?
6 Ger ji têkçûnê birevin jî; dê Mi-
sir wan li ba hev bicivîne, dê Mof[1]
wan binerd bike. Dê gîhayên kovî
li pertalên[2] wanî zîvînî yên biqî-
met bigerin, dê di çadirên wan de
kelem derkevin. 7 Rojên wanî ce-
zayê hat, rojên wanî hesab dayînê
hat. Bila Îsraêl vêya bizanibe! Ji
ber zêdeyiya sûcên we, ji ber me-
zinahiya neyarên we, peyxamber
xêvik û mirovê ruhanî dîn hate
hesibandin. 8 Efrayîm li benda
Xwedayê min bû, lê peyxamber di
hemû rêyên wî de dafik danîne û di
Perestgeha Xwedayê wî de neyarî
heye. 9 Mîna ku di rojên Gîbeayê
de be, xwe gellekî rizandin; dê ew
ê fesadiyên wan di bîr de bîne û
sehêtiyê li sûcên wan ve bike.
10 Îsraêl li çolê, bi min, mîna
goşiyek tirî hate xuyanîbûn;
bapîrên wan jî mîna dexla sala
pêşîn, ya darê hêjîrê dîtim. Lê belê,
gava hatin Baal-Peorê û xwe dan
tiştên şermezariyê û mîna tiştên
ku jê hez dikin mekrûh bûn.
11 Dê rewnaqiya Efrayîm, mîna
civîkekê bifire û here; dê ne
zayîn, ne jî ducanî bibe û dê kes
ducanî nemîne. 12 Ger zarokên
xwe mezin bikin jî, ez ê wan ji
zarokên wan ve bikim, heta ku tu
kes nemîne; belê, wax li serê wan,
gava wan biterikînim!
13 Min Efrayîm, mîna bajarê
Sûrê, li derekî xweş avabûyî dît;

1 Memfîs.

2 Alavên.

lê belê Efrayîm dê zarokên xwe
bibe ber celad!
14 Bide wan, ya XUDAN; ma
tuyê çi bidî wan? Rehîmên ku ji
ber davêjin û pêsîrên bêşîr bide!
15 Ji ber hemû xerabiyên wanî li
Gîlgalê, ez li wir, ji wan kerihîm.
Ji ber gunehên ku kiribûn, ez ê
wan ji mala xwe biqewirînim. Êdî
ez ê ji wan hez nekim; hemûyê
serokên wan asê ne! 16 Efrayîm
hate lêdan; rehên wan ziwa bûn,
êdî dê mêwan nedin. Bi rastî ger
zarokan bînin dinê jî, ez ê mêwên
xoşewîst, yên rehîmên wan biku-
jim. 17 Dê Xwedayê min wan red
bike, ji ber ku wî guhdarî nekirin
û dê di nava neteweyan de bigerin
û bisekinin.

10 Îsraêl mîna mêwekî
geşbûyî ye, mêwa xwe
dide. Çawa ku mêwên wê zêde
bûn, pêşkêşîgehên wê jî zêde bûn.
Her ku welatê wan dewlemend
bû, wê bi kevirên xweşik yên çik-
yayî ve xemilandin.
2 Dilê wan bi derewan ve tijî ne,
niha divê cezayê sûcên xwe hil-
girin: Dê ew ê pêşkêşîgehên wan
xera bike, kevirên wanî çikyayî
tune bike. 3 Belê, dê wê gavê bi-
bêjin: Qiralê me tune. Ji ber ku
em ji XUDAN natirsin û qiral, ma
ew dikare ji me re çi bike?
4 Dema peymanê dibirin, bi de-
rewan sondan didin û gotinên
vala dibêjin; dê bo vê yekê dara-
zî, mîna gihayê jahrdar ya ku di
hundirê şopên gîsinê di zeviyê de
yî de derkeve. 5 Yên ku li Samîri-
yê dijîn, dê ji ber pûta goļikê ya
ku li Beyt-Avenê ye bikevin tirsê.
Belê, dê gelê wê li ser wê bikevin
şînê û kahinên pûtperest yên ku ji
rewnaqiya wê dicoşin, ji ber ku ji
wir sirgûn dibe, dê li xwe bixin.
6 Dê pûtê bi xelatî, ji qiral Yarêb re,
ji Asûrê re bibin, dê Efrayîm rezîl
bibe û Îsraêl dê ji şîreta ku stendiye
bişerme. 7 Dê Samîriye, tevî qiralê
xwe mîna kefa ku li ser avê yî bi-
herike û biçe ne. 8 Û dê gunehên
Îsraêlê, cîhên pûtê peristinê yên
ku li Avenê ne tune bibin, dê stirî,
stirîmişk der û hêlê pêşkêşîgehên
wan bigirin. Û wê gavê ji çiyayan
re: Me buxumînin! û ji giran re: Bi
ser me de dakevin! bibêjin.
9 Ya Îsraêl, ji rojên ku te li Gîbayê
derbas kiriye de, te guneh kir! Li
wir we li dijî min di berxwe dan; ma
şerê ku li dijî xeraban hatiye veki-
rin, li Gîbayê nagihêje we? 10 Gava
ku ez bixwazim, ez ê wan bi ceza
bikim û dema ku bi gunehên xwe yî
cotîn ve hatin girêdan, dê netewe li
dijî wan bicivin.
11 Û Efrayîm mîna çêleka ciwan ya
ku hatiye perwerde kirin e, ji genim
kutanê hez dike. Lê belê ez ê nîrê tê-
xim histûyê wî yê xweşik, ez ê rextê
li pişta Efrayîm bixim; dê Cihûda
cotê bajo, Aqûp tirmixê bikişîne.

12 Rastiyê biçînin bona xwe, çinî-
na mêwên dilovaniyê bikin! Erdên
nû[1] biçînin; ji ber ku dema berîda-
na XUDAN e, heta ku ew were
û rastiyê bibarîne. 13 Lê belê we
xerabiyê ajotin, fesadiyê cinandin,
mêwa derewiyê xwarin. Ji ber ku
tu bi rêya xwe, bi pirraniya egîdên
xwe ve ewle bû. 14 Û bo vê yekê,
dê di nava gelê te de gurmîniya
şer derkeve û dê hemûyê sûrên
te xera bibin, mîna ku di şer de
Şalman, Beyt-Arbel hilweşand[2],
dayik tevî zarokên xwe li erdê ve
hatin xistin û perçe kirin. 15 Bey-
tel jî eynî tiştê bi we bike, ji ber
mezinahiya xerabiya we. Dema
berbang bavêje, dê qiralê Îsraêlê
mutleqa tune bibe.

*Hezkirina Xwedê ya ji Îsraêlê re*

Îşa 31,20-22

11 Dema Îsraêl zarok bû, jê
hez kirim. Û ji Misirê bangî
Lawê xwe kirim. 2 Her ku pey-
xamberan bangî wan kirin, ew ji
wan ve ewqas dûr ketin; ji Baa-
lan re qurban serjê kirin û ji pûtên
qewartî re buxur şewitandin.
3 Û min, min meşandinê hînî
Efrayîmê kir, wan girtim himbê-
za xwe, lê belê fêhm nekirin, yê
ku şîfayê daye wan ez im. 4 Min
wan bi tayên mirovayî, bi qeydi-
kên evînê ve ji xwe re kişand û
ez bûm yekî nîrên wan rakiriye,
xwar bûm û xwarinê dam wan.
5 Dê venegerin warê Misirê, lê
belê Asûr dê li serê wan bibe qiral,
ji ber nexwestin ku ji min re vege-
rin. 6 Û dê fir û fir şûr bizîvire li
ser bajarên wan û zendên deriyên
wan tune bike û ji ber şîretên wan
dê wan biçikîne.
7 Ji ber gelê min bi biryar e ku ji
min ve dûr bikeve. Bangî yê Bi-
lind bikin jî, kes wî bilind nake.
8 Ma ez ê çawa dev ji te berdim, ya
Efrayîm; ez ê çawa te bidim dest,
ya Îsraêl? Ya ku ji Adamayê re ki-
rime, ez ê çawa bi te bikim? Ez
ê te çawa vegerînim Seboyîmê?
Dilê min di hundirê min de hate
guherîn, hestên minî li berketinê
gişt pev re sor bûn[3].
9 Ez ê hêrsa xwe yî sor li ser serên
we nebarînim, Efrayîm ji nû ve
tune nekim. Ji ber ku ez ne mirov
im, Xwedê me û di nav te de yê
Pîroz im û êdî ez ê bi hêrs neyêm
ser we. 10 Dê li pêy XUDANê ku
mîna şêran digurme bimeşin, ji
ber ku gava ew bigurme, dê law bi
lerizandin ji rojavayê werin. 11 Ji
Misirê mîna civîkan, ji Asûrê mîna
kevokan, bi lerizandinê dê werin.
Û ez ê wan di malên wan de bidim
rûniştandin, dibêje XUDAN.

1 Şûv, bûre.
2 Têk bir.
3 Gurî bûn.

*Gunehê Îsraêlê*

12 Efrayîm bi derewan û mala
Îsraêlê bi fenekiyan ve dora min
girtin; lê Cihûda jî hîn bêhefsar, li
dijî Xwedê û Pîrozê Dilsoz e.

12 Efrayîm bayê dajo û di tû-
miya rojê de, li pêy bayê
rojhilatê ve dikeve; derew û zor-
destiya wî zêde dibe. Û bi Asûrê
ve peymanê çêdike û zeytê dişîne
Misirê.
2 Doza XUDAN bi Cihûda re jî
heye û li gor rêya ku Aqûp li pêy
çûye dê bê ceza kirin, dê berdêla
kirinên wî bide. 3 Aqûp di rehîma
dayikê de bi pahniya birayê xwe
girt û dema mezin bû, bi Xwedê
ve gulaşê kir. 4 Û bi milyaket re
gulaşê kir û wî bi bin xist; giriya û
lavayî ji wî kir. Di Beytelê de wî
ew dît 5 û Xwedayê artêşan XU-
DAN, li wir bi me re axifî. Ew bi
navê XUDAN tê bîranîn. 6 Bo vê
yekê, tu vegere Xwedayê xwe, bi
qencî û dadiyê ve bigire û hertim
li benda Xwedayê xwe be!
7 Efrayîm bazirgan e, şehîna bi
hîle di destê wî de ye, ji xapan-
dinê hez dike. 8 Û bi gotina: Ez
zehf dewlemend bûm bebiriyê
dike, ez gîhaştim hebûnê, pirr
kedê kişandim, dê sûcekî ku jê re
bibêjin guneh, di min de nebînin.
9 Lê belê XUDAN Xwedayê te
yî, te ji Misirê derxist ez im. Mîna
rojên cejnê, ez ê dîsa te di çadi-
ran de bidim rûniştandin. 10 Û
ji peyxamberan re jî gotim; belê,
pirr xewnûxeyalan dam dîtin; bi
navdîtiya wan mînakan dam.
11 Ma li Gîleadê fesadî heye?
Bi rastî jî pirr bêqîmet e! Li Gîl-
galê, ga li ser gayan qurban kirin,
pêşkêşîgehên wan, mîna koma
kevirên ku di erdê hatiye ajotin de
yî. 12 Û Aqûp reviya erdê Aram û
Îsraêl bona jinikekê bû qûl û mîhan
ajot. 13 Û XUDAN bi navdîtiya
peyxamberekî Îsraêl ji Misirê ve
derxist û bi navdîtiya peyxamberek
wan parast. 14 Efrayîm, ew[1] zehf
hêrs kir û dê ew ê[2] xwîna ku wî ri-
jandiye bavêje ser wî û Xudanê wî
şermezariya wî vergerîne ser wî.

*XUDAN ji Îsraêlê re hêrs dibe*

13 Her ku Efrayîm diaxifî, le-
rizîn bi holê ve digirt; li Îs-
raêlê bilind bûbû. Lê belê gava bi
peristina ji Baal re sûc kir, mir. 2
Û niha guneh li ser gunehan dikin
û ji zîvên xwe pûtên rijandî, pûtên
ku li gor fêhmkariya wan hatine
pêşniyar kirin çêdikin. Giştik jî
bi karekî hosteyî. Di derheqê van
mirovan de, bi avahiya: Yên ku
mirovan qurban dikin, golikan
radimûsînin! tê axaftin. 3 Bo vê
yekê dê vegerin mija sibehê û

[1] Xwedê.
[2] XUDAN.

xunava ku zû difire û diçe, qirşê
kayê ku ji bênderê ve ber ba dibe
û duyê ku ji bacê ve ba dibe û
diçe!
4 Lê belê XUDAN Xwedayê te,
yê ku te ji Misirê ve derxistiye ez
im; tuyê xeynî min Xwedê nas
neke, ji ber ku wekî din xelasker
nîne! 5 Min di çolê de, di axên
ziwa de çavdêriyê li te kir.
6 Gava bûn xwedî mêrg, têr bûn,
dema têr bûn, berbi xirûra xwe ve
ketin; bo vê yekê min ji bîr kirin.
7 Û ez jî li hemberî wan bûm mîna
şêrekî, mîna pilingekê di qeraxa
rê de ez ê kemînê bavêjim. 8 Ez
ê mîna hirçek mê ya ku ji çêlikên
xwe ve hatiye dûr xistin û derke-
vim ber wan û çermika[1] dilê wan
biçirînim û mîna şêrek mê wan li
wir bixwim û biqedînim; dê cena-
wirê beyaran wan perçe bikin.
9 Ya Îsraêl; li dijî min, li dijî alî-
karê xwe bûyîna te, helaqa te ye!
10 Kanê qiralê te, yê ku dê te di
hemû bajarên te de xelas bike? Û
kanê serwerên te? Kanê te bona
wan: Qiralek û serokan bide min!
gotibû. 11 Gava hêrs bûm, qira-
lekî dam te, gava hatim xezebê,
rahiştim û wî birim.
12 Sûcên Efrayîm kom bûne,
gunehê wî derbasî qeydê bûye.
13 Ew lawê pîreka bêaqil, ya ku
janên zayinê dikişîne ye. Ji ber
ku dema wext bê, ji rehîma vekirî
dernakeve.
14 Ez ê wan bi fîdyê ve xelas
bikim, ji destê warê miriyan, ji
mirinê bi fîdyê ve xelas bikim!
Xeteriya te li ku derê ye, ya mi-
rin? Xerakirina te li ku derê ye, ya
warê miriyan? Belê, teselî li ber
çavên min veşartiye[2].
15 Ger di nava birayên xwe de
bi xwe geş û mezin bibe jî, bayê
rojhilatê li ser hilma XUDAN ya
ku ji çolê ve tê were, dê çavkanî-
ya wî ziwa bibe, ava kaniya wî bê
birrîn, hemûya xizna pertalên wî
yên biqîmet bên talan kirin.
16 Dê Samîriye sûcê xwe li xwe
bike bar, ji ber ku li dijî Xwedayê
xwe serî hilda. Dê bi şûran ve
bikevin, zarokên wan dê bi erdê
ve bişewşin û perçe perçe bibin û
dê zikên pîrekên wanî ducanî bên
qelişandin!

*Hoşeya bona ku vegere XUDAN, ji Îsraêlê re lava dike*

Yêr 3,12-15.21-23; 31,18-21;
5.Mûs 30,1-10; Rom 11,25-36

14 Vegere XUDAN Xwedayê
xwe, ya Îsraêl; ji ber ku, tu
bona sûcên xwe tilpekî bû! 2 Bi
xwe re gotinan bigirin û vegerin
XUDAN; ji wî re: Li hemûyên
sûcên me ve biborîne! bibêjin. Ji
kerema xwe me qebûl bike, ûsa

1 Zar, xaşe, an jî: Perde.

2 An jî: Ez ê qet poşmaniyê nebihîzim.

ku, em di şuna qurbanê ganêran
de qurbanên lêvên xwe pêşkêş
bikin. 3 Asûr nikare me xelas
bike, em ê li hespên şer ve siwar
nebin. Û êdî em ê ji tiştên kirinên
destên xwe re, nebêjin: Xwedayê
me! ji ber ku sêwî li ba te dilova-
niyê dibîne!

*XUDAN hêviyê dide Îsraêlê*

4 Ez ê şîfa bidim cebaniyên wan,
ji dil ve ji wan hez bikim; ji ber ku
hêrsa min ji wî zîwirî! 5 Ez ê ji bo
Îsraêlê bibim mîna xunavê, ew ê
mîna sosinê çîçegê vekin û mîna
(wurza) Lubnanê reh berdin.
6 Dê bi guliyên wê belav bibin û
dê xweşikiya wê bibe mîna darê
zeytûnê û bêhna wê bibe mîna
(wurza) Lubnanê. 7 Dê dîsa mi-
rov di siya wê de rûnin; dê mîna
genim mezin bibin û mîna mêwa
tirî geş bibin; dê bêhna wê mîna
xemra Lubnanê be.
8 Efrayîm, dê bêje: Ma êdî çi karê
min bi pûtan re heye? Min bersi-
vê da û bi wî re eleqedar bûm! Ez
mîna serwiya[1] hêşîn im, çavkani-
ya berdariya mêweya te ez im!
9 Bona fêhm kirina van tiştan,
ma yê ku zanyar e kî ye? Û bona
zanîna wan, ma yê ku fêhmdar e
kî ye[2]? Ji ber ku rêyên XUDAN
rast in û yên rast di vê rêya de
dimeşin, lê belê yên ku serî hilda-
ne[3] di van rêyan de tilpekî dibin.

---

1 Selwî.
2 An jî: Yê ku aqlê wî hebe, dê ew ê vana fêhm bike û yê ku fêhmkar be, dê ew ê nas bike.
3 An jî: Yên gunehkar.

# YOWÊL

*Pêşgotin*

Peyxamber di derbarê bêtariyek kulliyan ya tirsehêz û ziwayiya li Îsraêlê de dibêje. Van bûyeran, mîna nîşana roja Xwedê – dema yên ku li dijî wî ne dê bi ceza bike – dibîne. Bona ku gelê Xwedê vergerîna rewşa wanî berê, soza bona ku pîroz bike, banga ku bona tobe bikin digehîne gel. Tiştek din ya girîng jî ev e ku soza di derheqê dê Xwedê, Ruhê xwe ji pîrek, zilam, xort, kalepîr ji herkesî re bişîne de ye.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:17 | Bêtariya kulliyan |
| 2:18-27 | Soza ku Xudan bona gel bighîne xweşiya wanî berê, daye. |
| 2:28-3:21 | Roja Xudan |

*Êrîşa Kulliyan*

2.Mûs 10,12-15

1 Gotina XUDAN ya ji Yowêlê
lawê Pêtûêl re hatiye:
2 Ya kalepîrno, vêya guhdarî
bikin û hemûyên ku li welêt rûdinin, guh bidin vêya! Ma di rojên
we de û di rojên bapîrên we de ya
wusa bûye? 3 Vêya ji lawên xwe
re bibêjin û bila lawên we ji lawên
xwe re û lawên wan jî ji nifşeya
ku dê were re bibêjin! 4 Kulliyan ya ku ji ber gazamê[1] mayîne,
xwarin û ya ku ji ber kullî maye,
yelek xwar û ya ku ji ber yelekê
maye, hasîl[2] xwar.
5 Hişyar bibin ya serxweşno û bigirîn! Û ya yên xemrê vedixwin;
hûn hemû bona xemra şêrîn feryadê bikin; ji ber ku ji devê we
ve hate rahiştin! 6 Ji ber ku neteweyek xwurt û nayê jimartinê bi
ser welatê min ve derket; diranên
wê diranên şêr e û di wê de diranê
kakîlê yê şêrê mê heye. 7 Mêwa
min xopan kir, qalikê darê minî
hêjîrê qeşart; wê bitûmî qeşart û
avêt erdê; guliyên wê gewr bûn.

---

*1* Sê bêjeyên Îbranîtî yên di vê ayetê de ne, dibe ku celebên kullî yên cuda cuda ne, an jî li gor çaxên mezinbûna kulliyê bin.

*2* An jî: Yê wêranker.

8 Mîna bûka ku bona mêrê ciwanti-
ya xwe cilikan[1] li xwe dike şînê bi-
gire! 9 Ji mala XUDAN pêşkêşiya
nan û pêşkêşiya rijandinê hate
birrîn; kahînan, xizmetkarên XU-
DAN şînê digirin. 10 Zevî xopan
bû, erd şînê digire; ji ber ku genim
xopan bû, xemra nû ziwa bû, rûn
çikiya. 11 Ji ber genim û ceh, ya
cotkarno, şerm bikin, ya rezkarno,
feryadê bikin! Ji ber ku zadê zevi-
yê tune bû. 12 Mêw ziwa bû û darê
hêjîrê hate birrîn, hinar û xurme û
sêv, hemû darên beyarê hişk bûn;
ji lawên mirov kêfxweşî rabû.

*Banga bona tobekirinê*

13 Ya kahînno, cilikan li xwe
bikin û şînê bigirin; ya xizmet-
karên pêşkêşîgehê, feryadê bikin!
Ya xizmetkarên Xwedayê min,
werin di cilikê de şevê biborînin!
Ji ber ku ji mala Xwedayê we
pêşkêşiya nan û pêşkêşiya rijan-
dinê hate birrîn. 14 Rojiyê pîroz
bikin, bangî civandinê bikin, ka-
lepîran û hemûyên ku li welêt rû-
dinin li mala Xwedayê xwe XU-
DAN ve bicivînin û ji XUDAN re
feryadê bikin!
15 Ax ew roj! Ji ber ku roja XU-
DAN nêzîk e û ji aliyê Yê ku Hêza
wî têra her tiştî dike ve têkçûnek tê.
16 Ma ji ber çavên me xwarin û ji
mala Xwedayê me şahî û kêfxweşî
nehate birîn? 17 Di bin kermeyan de
tov riziyan; embar vala man, depo
xera bûn, ji ber ku genim hişk bû.
18 Heywan çawa dinalin! Naxirên
dewaran şaşbûyî, ji ber ku ji wan
re çêregeh nîne; keriyên mîhan jî
perîşan bûn! 19 Ya XUDAN, ez ji
te re hawarê dikim, ji ber ku agir
çêregehên çolê xwar û qedand û
pêt hemû darên beyarê qemirand[2]!
20 Heywanên beyarê jî bi bêhn ve-
danê bangî te dikin; ji ber avên ku
diherikin ziwa bûn û agir çêregehên
çolê xwar û qedand.

*Roja XUDAN*

Pey 9,2-11

2 Li Siyonê li boriyê bixin û di
çiyayê minî pîroz de bi denge-
kî bilind lêxin! Bila hemûyên ku
li welêt rûdinin bilerizin; ji ber ku
roja XUDAN tê, ji ber ku nêzîk
e; 2 roja reşî û tariyê, roja ewr û
reşetariyê; mîna tîrêja berbangê
ya ku li ser çiyayan ve belavbûyî,
neteweyek mezin û xwurt tê; ji
bêpêşîbûnê ve mîna vêya ne-
bûye û paşî vêya di salên gellekî
nifşeyan de jî dê carekî din nebe.
3 Di pêşiya wan de agir dixwe û
diqedîne û li pêy wan pêt diqe-
mirîne; li pêşiya wan, welat mîna
bexça Adenê û li paşî wan mîna
çola tenha û kesî ku ji destên wan
bireve û xelas bibe jî nîne.

[1] Yanê çûl.

[2] An jî: Şewitand.

4 Xuyabûna wan mîna xuyabû-
na hespan û siwarên cengê çawa
be wusa baz didin. 5 Li ser girên
çiyayan mîna şemateya erebeyên
cengê, mîna qirçîniya pêta agirê
ku firêzê dixwe, mîna neteweyek
xwurt ya bona cengê rêz bûyîne
dipengizin. 6 Li hemberî wan
neteweyan janê dikişînin; hemû
wec diçilmisin. 7 Mîna egîdan
baz didin; mîna zilamê cengê bi
dîwêr ve radipelikin û her yek di
rêya xwe de dimeşe û rêzên xwe
xera nakin. 8 Û tu kes birayê xwe
tan nade; her kes di rêya xwe
de dimeşe û ji nav çekan ve êrîş
dikin û derbas dibin û naşikên.
9 Di bajêr de dipengizin, li
ser dîwarên bajêr baz didin; di
hundirê xaniyan de radipelikin,
mîna dizan ji şivakan ve dikevin.
10 Li ber wan erd diheje; ezman
dilerize; roj û heyv tarî dibin
û sitêrk ronahiyên xwe vedişêrin.
11 Û XUDAN li pêşiya artêşa
xwe bang dike; ji ber ku artêşgeha
wî zehf mezin e; ji ber yê ku go-
tina wî bîne cîh xwurt e; ji ber
ku roja XUDAN mezin û zehf
tirsehêz e; ma kî dikare li ber wî
bisekine?

*Vegerin XUDAN*

12 Lê belê niha jî, XUDAN dibêje,
bi hemûya dilê xwe û bi rojiyê û bi
girî û bi li xwe xistinê vegerin min
13 û ne kincên xwe, lê belê dilên
xwe biçirînin û vegerin Xwedayê
xwe XUDAN; ji ber ku ew ke-
remkar[1] û dilovan e, dereng hêrs
dibe û xêra wî zehf e û ji ber asîwê
poşman dibe. 14 Ma kî pê dizane?
Dibe ku vegere û poşman bibe û
li pêy xwe bereketê, bona Xwe-
dayê we XUDAN pêşkêşiya nan
û pêşkêşiya rijandinê bihêle.
15 Li Siyonê li boriyê bixin, rojî
pîroz bikin, bangî civandinek
xusûsî bikin! 16 Netewê bidin
hev, civakê pîroz bikin, zilamên
kalepîr bicivînin, zarokên biçûk û
yên di pêsîrê[2] de ne bicivînin; bila
zava ji odeya xwe û bûk ji gerde-
ga xwe derkeve! 17 Kahînan, xiz-
metkarên XUDAN, bila di navbe-
ra eywan û pêşkêşîgehê de bigirîn
û bibêjin: Ya XUDAN, netewa
xwe biparêze, mêrasa xwe nede
riswatiyê ku bila neteweyan jê re
nebin serwer; ma çima bila di nav
neteweyan de: Kanê Xwedayê
wan li ku derê ye? bête gotin.

*Bersiva XUDAN*

18 Wê çaxê XUDAN welatê xwe
hêvişand û heyfa wî li netewa wî
hat. 19 Û XUDAN bersivê da û
ji netewa xwe re got: A vay, ez
ê genim û xemra nû û rûn ji we
re bişînim, hûn ê bi wê têr bibin

*1* Lutifkar, qencîker, an jî: Xêrxwaz.

*2* Hîn di çaxê şîr mijandinê de, an jî: Bimemik in.

û êdî ez ê we di nav neteweyan
de riswa nekim 20 û ez ê artêşa
bakur ji ser we ve dûr bixînim û
ez ê wê bişînim warekî ziwa û
tenha, yên di pêşiya wê de diçin
bajom behra rojhilatê û yên wê yî
li pêy tên bajom behra rojavayê û
dê laşê wê bêhn bide û dê bêhna
wê yî xerab bilind bibe, ji ber ku
tiştên tirsehêz kirin.
21 Metirse ya erd, bicoşe û
kêfxweş bibe! Ji ber ku XUDAN
karên mezin kir. 22 Metirsin, ya
heywanên beyarê! Ji ber ku çêre-
gehên çolê şîn tên, ji ber ku dar
fêkiyên xwe hilgirtine, darê hêjîrê
û mêw berên xwe didin. 23 Û ya
lawên Siyon, di Xwedayê xwe
XUDAN de bicoşin û kêfxweş bi-
bin! Ji ber ku barana pêşîn bi tûmî
bi pîvana wê ve dide we û ji we re
mîna ku berê dide baranê, barana
pêşîn û barana dawîn dibarîne. 24
Û dê cîhên bênderê bi genim ve
tijî bin û dê keştî bi xemr û rûn ve
tijî bin û ji ser re biçin. 25 Û ez ê
berdêla salên ku artêşa minî me-
zin, ya ku şandim nav we, salên
ku kullî, yelek û hasîl û gazam
xwarine bidim we. 26 Û hûn ê bi
zêdeyî bixwin û têr bibin û hûn ê
ji navê Xwedayê xwe XUDANê
ku bona we tiştên mezin kirine
re şikiryê bikin û dê netewa min
abadîn neyê şermezar kirin! 27 Û
hûn ê bizanibin ku ez di navenda
Îsraêlê de me û Xwedayê we XU-
DAN ez im û kesî din nîne û dê
netewa min abadîn neyê şermezar
kirin!
28 Û dê paşî wê wusa bibe ku, ez
ê Ruhê xwe birijînim ser hemû
mirovan; dê lawên we jî, qîzên
we jî peyxambertiyê bikin, dê
kalepîrên we xewnan bibînin,
xortên we dê xewn û xeyalan bi-
bînin; 29 di wan rojan de ez ê bi
ser dîlan jî û bi ser cariyan ve jî
Ruhê xwe birijînim. 30 Û ez ê li
ezmanan û li erdê elametan bidim
xuya kirin; xwîn û agir û sitûnên
dûyê. 31 Berî ku roja XUDAN
ya mezin û tirsehêz were, dê roj
bête zivirandinî tariyê û heyv jî
bête zivirandinî xwînê. 32 Û dê
wusa bibe ku, her kî bangî navê
XUDAN bike dê xelas bibe; ji
ber mîna ku XUDAN gotiye, li
Çiyayê Siyonê û li Orşelîmê dê
di nav yên ku reviyane û xelas
bûne û yên ku li pêy mayîne de,
dê kesên ku XUDAN bangî wan
kiriye hebin.

*Dê Netewe bêne daraz kirin*

3 Ji ber ku a vay, di wan rojan
de û di wê wextê de, dema
sirgûnên Cihûdayê û Orşelîmê
şunda bînim, 2 ez ê hemû gelan
bidim hev û ez ê wan deynim
geliya Yehoşafatê û ji ber nete-
wa xwe ya ku wan di nav nete-
weyan de belav kirine û ji ber
mêrasa xwe Îsraêlê, ez ê li wir

ji wan re daraziyê bikim[1]; wan
welatê min jî par kirin 3 û bona
netewa min pişkê avêtin û wekî
berdêla fahîşê be lawikekî dan
û bona ku vexwarinê vexwin,
bi berdêla xemrê qîzekê firotin.
4 Him jî hûn, ya Sûr û Sayda û
hemûya aliyê Filistînê, ma hûn ji
min re çi ne? Ma hûn ê berdêlê
bidin min? Ger hûn berdêlê bi-
dine min, ez ê berdêla we bi lezî
vegerînim serê we! 5 Madem
ku we zîv û zêrê min stendin û
tiştên minî xweşik û biqîmet bi-
rin perestgehên xwe 6 û bona
lawên Cihûda û lawên Orşelîmê
ji sînorên wan dûr bixînin, we ew
firotin lawên Yewnaniyan; 7 a
vay, ji cîhê ku we wan firotine ez
ê tevgerê bidim wan û kirina we
ez ê vegerînim serên we 8 û ez
ê lawên we û qîzên we bifiroşim
lawên Cihûda û dê wan bifiroşin
neteweyek dûrê, Şebayiyan; ji
ber ku XUDAN got.
9 Di nav gelan de vana bang bikin;
cengekê amade bikin; tevgerê bi-
din egîdan; bila hemû zilamên
cengê nêzîk werin, hilkişin jorê!
10 Hesinên xwe yî qûsikê bikin
şûr û kêrên xwe yî rezê bikin rim;
yê ku lawaz e bila bibêje: Ez egîd
im! 11 Lez bikin, ya hemû gel-
no, ji dorê ve werin û bicivin! Ya
XUDAN, egîdên xwe daxîne wê
derê! 12 Bila gel werin tevgerê û
hilkişin geliya Yehoşafatê; ji ber
ku ez bona daraziyê li hemû ne-
teweyên ji dorê ve tên bikim, ez
ê li wir rûnim. 13 Dasê berdin, ji
ber ku dexl[2] gehîştiye; werin, bi
lingên xwe ve bieciqînin; ji ber
ku mahsere tijî ye, curn[3] ji ser ve
diçin! Ji ber ku xerabiya wan me-
zin e!
14 Ajaweyan, di çemê daraziyê
de ajaweyan! Ji ber ku di çemê
daraziyê de roja XUDAN nêzîk e.
15 Roj û heyv tarî dibin û sitêrk
ronahiya xwe vedişêrin. 16 Û dê
XUDAN ji Siyonê ve bigurme û
dê ji Orşelîmê ve bang bike û dê
erd û ezman bihejin; lê belê dê
XUDAN bona netewa xwe bibe
cîhekî sitariyê û bona lawên Îsraêl
bibe birc!

*Dê XUDAN gelê xwe Pîroz bike*

17 Û hûn ê bizanibin ku, yê li
çiyayê minî pîroz Siyonê rûdine
Xwedayê we XUDAN ez im û dê
Orşelîm pîroz bibe û êdî dê ji hun-
dirê wê ve biyan derbas nebin!
18 Û wê rojê dê wusa bibe ku, dê
çiyayan xemra şêrîn dilop bidin
û dê giran şîr biherikînin û dê di
hemû newalên Cihûdayê de av
biherikin û dê ji mala XUDAN ve

1 Ez ê li wir wan daraz bikim, an jî: Daraziyê bînim cîh.
2 Çandinî.
3 Teşt.

çavkaniyek derkeve û dê avdanê li geliya Şîttîmê bike!
19 Ji ber zordestiya ku ji lawên Cihûda re kirine, dê Misir tenha bimîne û dê Edom bibe çola tenha, ji ber ku li welatên xwe xwîna bêsûc rijandin.
20 Lê belê dê Cihûda abadîn û Orşelîm ji nifşe heta nifşeyan[1] bimîne!
21 Û ji xwîna wan ya ku paqij nekirime, ez ê wan paqij bikim; ji ber ku XUDAN li Siyonê rûdinê.

[1] Di hemûya nifşeyan de.

# AMOS

*Pêşgotin*

Amos, peyxamberê yekem e ku di Kitêba Pîroz de gotinên wî tevî firawanên xwe hatine qeyd kirin. Çawa ku Cihûdî ye lê dîsa jî B.Z. heta navîna sedsala 8'an, herî zêde bangî mirovên li qiraletiya bakur dijîn re kir. Di wê demê de mirov di nava firehî û ewlekariyê de dijiyan. Çi heye Amos dît ku firehî di nav hinek dewlemendan de dimîne û bi neheqî û zordestiya ku li ser xizanan dike xwe xwedî dike. Kirinên olî ne ji dil bû; ewlekarî di dîtinê de hebû, lê di rastiyê de tunebû. Amos wêriya û da bihîstin ku dê Xwedê gel biceza bike, bi gotina: "Bila rastî mîna çem her tim biherike" bang kir. "Dibe ku Xudan, Xwedayê ku Serwerê Her Tiştî ye, xêr û xweşiya xwe ji yên ku ji nîjada Ûsiv zindî mane re bike!" got (5,15).

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:5 | Bicezakirina cîranên Îsraêlê |
| 2:6-6:14 | Bicezakirina Îsraêliyan |
| 7:1-9:15 | Pênc xewn û xeyal |

1 Gotinên Amosê ku di nav
şivanên Tekoayê de bû; wî
vana di rojên Ûzziyayê qiralê
Cihûdayê de û di rojên Yerobo-
amê lawê Yoaşê qiralê Îsraêlê de,
du salî berî erd hejînê di derheqê
Îsraêlê de dîtiye.
2 Û got: Dê XUDAN ji Siyonê
ve bigurme û dê ji Orşelîmê ve
dengê xwe bilind bike û dê çêre-
gehên şivanan şînê bigirin û dê
girê Karmelê ziwa bibe.

*Bicezakirina Cîranên Îsraêlê*

3 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya Şamê, ez
ê cezê wê şunda negirim; ji ber ku
bi moşena hesinî li Gîleadê xistin.
4 Ez ê jî agir bişînim mala Hazaêl
û dê qesrên Ben-Hadad bixwe û
biqedîne. 5 Û ez ê çilmêreya de-
riyê Şamê bişkînim û ez ê yên ku
li wir rûdinin ji çemê Avenê û yê
ku gopal di destê xwe de digire ji
mala Edenê bavêjim û dê netewa

Sûriyê berbi Kîrê ve bên ajotin!
XUDAN dibêje.
6 XUDAN wusa dibêje: Ji ber
sê heta çar qatî gunehkariya Ga-
zayê, ez ê cezê wê şunda negirim;
ji ber ku bona bidin destê Edomê
hemûya netewê sirgûn kirin. 7 Ez
ê jî agir bişînim dîwarê Gazayê û
dê qesrên wê bixwe û biqedîne.
8 Û ez ê yên ku li wir rûdinin ji
Aşdodê û yê ku gopal di destê
xwe de digire ji Aşkelonê rakim
û bavêjim û ez ê destê xwe li dijî
Ekronê bizivirînim û dê maweya
Filistiyan tune bibe, Xudan, XU-
DAN dibêje.
9 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya Sûrê, ez
ê cezê wê şunda negirim; ji ber ku
hemûya netewê dan destê Edomê
û peymana biratiyê di bîra xwe
de neanîn. 10 Ez ê jî agir bişînim
dîwarê Sûrê û dê qesrên wê bi-
xwin û biqedînin.
11 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya Edomê,
ez ê cezê wê şunda negirim; ji
ber ku bi şûr bera birayê xwe da
û hesê merhameta wî xeniqand û
hêrsa wî her tim hov bû û qet xe-
zeba xwe ji dest berneda. 12 Ez ê
jî agir bişînim Temanê û dê qes-
rên Botsrayê bixwe û biqedîne.
13 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya lawên
Ammon, ez ê cezê wan şunda ne-
girim; ji ber bona ku sînorên xwe
fireh bikin, zikên pîrekên Gîleadî
yên ducanî qelişandin. 14 Ez ê jî
agir di dîwarê Rabbayê de pêbixim
û di roja cengê de bi şemateyê û di
roja bahozê de bi bagerê dê qesrên
wê bixwe û biqedîne 15 û dê qiralên
wan, ew bi xwe û tevî serokên wan
dê biçin sirgûnê, XUDAN dibêje.

2 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya Moa-
bê, ez ê cezê wê şunda negirim; ji
ber heta ku kir mîna kilsê, hesti-
yên qiralê Edomê şewitand. 2 Ez ê
jî agir bişînim Moabê û dê qesrên
Keriyotê bixwin û biqedînin û dê
Moab bi tevliheviyê, bi şematê û
bi dengê boriyê bimire. 3 Û ez ê
serwer ji hundirê wê rakim û ba-
vêjim û tevî wê ez ê hemû serokên
wê bukujim, XUDAN dibêje.
4 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya Cihû-
dayê, ez ê cezê wê şunda negirim;
ji ber ku zagona XUDAN biçûk
dîtin û bi daraziya wî ve negir-
tin û derewên[1] wan, wan ji rê ve
derxistin, ew derewên ku bapîrên
wan jî li pêy meşiyabûn. 5 Ez ê jî
agir bişînim Cihûdayê û dê qesrên
Orşelîmê bixwin û biqedînin.

*XUDAN, Îsraêlê biceza dike*

6 XUDAN wusa dibêje: Ji ber sê
heta çar qatî gunehkariya Îsraêlê,

[1] An jî: Pût.

ez ê cezê wê şunda negirim; ji ber
ku yê salih bi pere û xizan jî bi
cotekî çaroxê firotin; 7 ew yên
ku, ji toz û axa li ser serê xizana
yî can didin û rêya kesên stûxar
çewt dikin û bona navê minî pîroz
gemarî bikin zilamek û lawê wî
diçin eynî pîreka ciwan 8 û li cem
her pêşkêşîgehê, li ser kincê ku bi
mişkaneyî hatiye stendin radike-
vin û li mala Xwedayê xwe xemra
yên ku cirmê didin, vedixwin!
9 Lê belê min li ber wan Amorî
helaq kir, qama wê mîna qama
darên erzê gir û ew bi xwe wekî
darçiloyê xwurt bû; lê belê min ji
jor ve mêwê wê û ji jêr ve jî reha
wê helaq kir. 10 Û min we ji warê
Misirê ve derxist û bona ku hûn
warê Amorî ji xwe re bikin milk,
min çel salî li çolê rê nîşanî we da.
11 Û ji lawên we peyxamberan û
ji egîdên we Nezîran derxistim.
Ya lawên Îsraêlê, ma ne wusa ye?
12 Lê belê we xemrê bi Nezîran
ve dan vexwarin û we bi gotina:
Peyxamberiyê nekin! emir dan
peyxamberan.
13 Ereba ku bi demedan ve tijî
çawa erdê bieciqînî, ez ê jî li cîhê
ku hûn lê ne we wusa bieciqînim.
14 Û yê ku lez dike, dê nikaribe
bireve û zilamê bi quwet dê nika-
ribe quweta xwe nîşan bide û dê
egîd nikaribe canê xwe xelas bike
15 û yê kevanê dikişîne nikaribe li
ser pêlan bisekine û yê ku bi lingê
xwe jîr e nikaribe xwe xelas bike
û yê ku li hespê siwar be, dê ni-
karibe canê xwe xelas bike 16 û
di nav egîdan de zilamê mêrxas
dê wê rojê tazî bireve! gotina XU-
DAN.

3 Ya lawên Îsraêlê, vê gotina
ku XUDAN ji we re, ji hemû
eşîra ku ji warê Misirê derxistiye
re gotiye guhdarî bikin! û got: 2 Ji
hemû eşîrên ku li rûyê erdê ne tenê
we nas kirim, ji ber vê yekê ez ê
sehêtiya hemû fesadiyên we li ser
we bikim.

*Ger Xwedê biaxife, Peyxamber nikare bêdeng bimîne*

3 Ma du zilam, berî ku li hev bikin,
dikarin pev re bimeşin? 4 Dema
nêçîra wê tune be, ma li daristanê
şêr digurme? Ma şêrê ciwan heta
ku bi tiştekî negire, ji qula[1] xwe
dengê xwe derdixe? 5 Çawa ku
bona civîkê dafik nehatiye avêtin,
ma dîsa ew dikeve feqa li erdê ye?
Ma çawa ku feq tiştekî negirtibe
dîsa ji erdê ve dipengize? 6 Ma
gava li bajêr borî bête lêxistin,
çawa netewe natirse? Çawa xerabî
bête bajarekî, ma dibe ku XUDAN
wê nekiribe? 7 Rastî, heta ku Xu-
dan, XUDAN ji qûlên xwe yî pey-
xamber re raza xwe veneke, nikare
tiştekî bike. 8 Û şêr gurmiya: Ma

1 Şikeft.

kî natirse? Xudan, XUDAN got:
Ma kî peyxambertiyê nake?
9 Li Aşdodê di qesran de û li warê
Misirê, di qesran de bidin bihîstin
û bibêjin: Li ser çiyayê Samîriyê
bicivin û tevliheviyên mezin yên
di navenda wê de ne û xedariyên
ku di hundirê wê de ne bibînin.
10 Ji ber ku ew bi rastî kirinê ve
nizanin, gotina XUDAN, ewên
ku zordestî û talankariyê di qes-
rên xwe de kom kirine. 11 Ji ber
vê yekê Xudan, XUDAN wusa
dibêje: Dê neyar derkeve û dor û
berên welatê te bigire û dê hêza te
ji te bike û dê qesrên te bên talan
kirin.
12 XUDAN wusa dibêje: Şivan
çawa bikaribe ji devê şêr du şeqî
an jî pariyekî guh xelas bike,
lawên Îsraêlê, yên li Samîriyê, di
quncîka sedirê de û li ser balîfên
livînan yên hevrişîm in rûdinin jî
dê wusa xelas bibin!
13 Guhdarî bikin û li dijî mala
Aqûp şahdeyiyê bikin, Xudan,
XUDAN, Xwedayê artêşan
dibêje! 14 Ji ber ku di roja sehêti-
ya mêrkuştinên Îsraêlê de li ser
wan bikim ez ê li pêşkêşîgehên
Beytelê jî bixim û dê qiloçên
pêşkêşîgehê bên jêkirin û dê
bikevin erdê. 15 Û ez ê tevî mala
havînê li mala zivistanê bixim û
xaniyên ji diranê fîlê dê tune bibin
û dê xaniyên mezin bibin xopan!
gotina XUDAN.

*Îsraêl naxwaze ku vegere XUDAN*

4 Ya hûn, çêlekên Başanê yên li
çiyayê Samîriyê ne, pîrekên ku
tengasiyê li feqîran dikin, tahdê li
xizanan dikin û ji efendiyên xwe
re: Bîne ku em vexwin! dibêjin,
vê gotina guhdarî bikin: 2 Xu-
dan, XUDAN li ser pîrozbûyîna
xwe sondê da ku, a vay, ew rojan
tên ku dê we bi çanqilan û yên li
pêy mayîne jî bi şewka masiyan
bikişînin û bibin. 3 Û hûn ê ji ne-
qeban derkevin, her pîrek dê ji yê
ku li hemberî xwe ye derkeve û
hûn ê xwe bavêjin Harmonê! go-
tina XUDAN.
4 Werin Beytelê û guneh bikin!
Werin Gîlgalê û gunehê zêde
bikin! Û her sibê qurbanên xwe
û di her sê rojê de carekê de-
hekê xwe bînin! 5 Û pêşkêşiya
şikiryê ya bihavên pêşkêş bikin
û pêşkêşiyên xwe yî ji dil bidin
bang kirin û bihîstin! Ji ber yê ku
hûn jê hez dikin ev e, ya lawên Îs-
raêlê! gotina Xudan, XUDAN.
6 Him jî li hemû bajarên we min
paqijiya diran û li hemû cîhên we
xelaya nan da we û hûn ji min re
venegeriyan! gotina XUDAN.
7 Çawa ku hîn ji dema paleyiyê[1]
re sê meh hebû, lê dîsa baranê jî
ji we parastim û bi ser serê baja-
rekî barandim û bi ser bajarê din

[1] Dema dasê, çandin, an jî: Dirûnê.

ve nebarandim; bi ser zeviyekê
bariya û zeviya ku bi ser ve ne-
bariya ziwa bû. 8 Û du sê bajar
bona ku avê vexwin bi gerê çûn
bajarekî û bi avê ve têr nebûn û
hûn ji min re venegeriyan! gotina
XUDAN. 9 Min kerehûyê û ufni-
kiyê bi ser zadê we ve şand û li
we xist; ji bexçeyên we û ji rezên
we û ji darên we yî hêjîr û zeytûnê
gellekan kulliyan xwarin û hûn ji
min re venegeriyan, gotina XU-
DAN. 10 Mîna ku li Misirê bûye,
webayê şandim nav we; egîdên
we bi şûr ve kuştim û hespên we
ajotim û birim; heta bêhna xerab
ya artêşgeha we gîhandim pozên
we û hûn ji min re venegeriyan!
gotina XUDAN. 11 Xwedê So-
dom û Gomora çawa bi serûbinî
kiribe, bi vî awayî di nav we de
bajaran bi ser û binî kirim û hûn
mîna parîkê êzingê yê ku ji ber
agir hatiye xelas kirin û nîv şewitî
bûn û hûn ji min re venegeriyan,
gotina XUDAN.
12 Ji ber vê yekê ez ê ji te re wusa
bikim ya Îsraêl; madem ku ez ê ji
te re wusa bikim, ya Îsraêl, bona
pêrgîniya Xwedayê xwe ama-
de be! 13 Ji ber ku, a vay, yê ku
şîmşatê daye çiyan û yê ku baho-
zê afirandiye û yê ku, ka ramana
wî çî ye ji mirov re dibêje, yê ku
berbangê tarî dike û pê li ser cîhên
bilind ên dinê dike – navê wî XU-
DAN e, Xwedayê artêşan e.

*Banga Tobekirinê*

5 Ya mala Îsraêlê, vê gotina ku
ez ê bi lawijî li ser we bixwî-
nim guhdarî bikin! 2 Qîza Îsraêlê
ket, dê carek din ranebe; li ser axa
xwe ve hatiye raxistin, kesî ku wê
rake nîne. 3 Ji ber ku Xudan, XU-
DAN wusa dibêje: Dê sed zilamê
bajarê ku jê hezar zilam derdike-
ve bimîne û dê yê sed zilam jê
derdikeve, ji mala Îsraêlê re deh
zilam bimînin.
4 Ji ber ku XUDAN ji mala Îsraêlê
re wusa dibêje: Li min bigerin û
hûn ê bijîn; 5 lê belê li Beytelê
negerin û nekevin Gîlgalê û der-
basî Beer-Şebayê nebin; ji ber ku
dê Gîlgal muheqeq bi sirgûnî bête
birin û dê Beytel bibe tunebûnek!
6 Li XUDAN bigerin û hûn ê bijîn;
ya na li mala Ûsiv ew ê mîna agi-
rekî derkeve û dê agir wî bixwe û
biqedîne û li Beytelê tu kesê ku wî
bitefîne dê dernekeve. 7 Ya yên ku
maf kirine mîna gîhayê tahl[1] û yên
ku dadiyê avêtine erdê! 8 Li yê ku
Perwîn û çerxa Oriyonê afirandiye
û sîha mirinê werdigerîne sibehê û
yê ku rojê bi şevê ve tarî dike û yê
ku bangî avên behrê dike û li yê
ku wan dirijîne rûyê erdê bigerin;
navê wî XUDAN e; 9 yê xwurt
nişka ve têk dibe û bi ser bircê ve
xerakirin tê.

*1* Pêlîn, an jî: Vermût.

10 Ji zilamê ku li ber derî bi wan
ve dipeke dikerihin û ji yên ku bi
rastî dibêje erjeng dibin. 11 Ji ber
vê yekê, madem ku hûn yê xizan
digrin bin lingan û ji wî xelatên
genim distînin; we ji kevirên qe-
wartî xaniyan ava kirin, lê belê
hûn ê di wan de rûnenin; we rezê
xweşik danîn, lê belê hûn ê xemra
wan venexwin. 12 Ji ber, ez diza-
nim ku gunehkariyên we zêde û
sûcên we giran in, ya yên tenga-
siyê didin kesê salih, yên bertîlê
distînin û di derî de mafê xizan çewt
dikin! 13 Ji ber vê yekê zilamê ba-
qil, dê di vê demê de bêdeng bimî-
ne; ji ber ku wext xerab e.
14 Ne li xerabiyê, lê li qenciyê bi-
gerin ku, hûn bijîn û bi vî awayî
XUDAN, Xwedayê artêşan, mîna
ku hûn dibêjin dê bi we re be.
15 Ji xerabiyê bikerihin û ji qen-
ciyê hez bikin û di derî de mafê
bizeximînin; dibe ku XUDAN,
Xwedayê artêşan, ji maweya Ûsiv
re sayedariyê bike.
16 Ji ber vê yekê Xudan, Xwedayê
artêşan XUDAN wusa dibêje: Dê
di hemû qadan de dest bi fixanê
bikin! Û di hemû kûçan de: Dê bi
kirina ax û ax! binalîn û dê cotkar
ji şîn girtinê re û yên ku bikaribin
lawijan bêjin ji feryadê re bang
bikin 17 û dê di hemû rezan de
fixan dest pê bike; ji ber ku ez ê ji
nav we ve derbas bibim, XUDAN
dibêje.

*Roja XUDAN*

Tsêf 1,14-18

18 Wey li serê yên ku roja XU-
DAN dixwazin! Ma çima hûn
roja XUDAN dixwazin? Ew ne
ronahî ye, lê belê tarî ye. 19 Çawa
ku zilam ji ber şêr direve, lê hirç
derdikeve hemberî wî; an jî tête
malê û destê xwe disipêre dîwêr û
mar pê vedide. 20 Roja XUDAN
ne ronahî, lê ma dê nebe tarîbûn?
Belê, reşetarîbûn û di wê de bi-
riqandin nîne.
21 Ez ji cejnên we dikerihim, ez
wan biçûk dibînim û ji civînên we
yî cejnê jî hez nakim! 22 Ger hûn
pêşkêşiyên xwe yî şewitandinê û
pêşkêşiyên xwe yî nan ji min re
pêşkêş bikin jî ez razî nabim û ez
ê li pêşkêşiyên we yî xweşiyê yên
ji heywanên we yî qelew in ve ne-
nihêrim. 23 Şemateya qesîdeyên
xwe ji min ve dûr bibe; ji ber ku
ez ê ahenga harpa[1] te jî guhdarî
nekim. 24 Tenê bila maf mîna
avan û dad mîna çemekî xwurt
biherikin!
25 Ya mala Îsraêlê, ma we li çolê,
çel salî pêşkêşiyan û qurbanan ji
min re anîn? 26 Bi rastî, we sin-
doqa qiralên xwe û sindoqa pûtên
xwe, sitêrka îlahên xwe yî ya we
çêkirine kişandin! 27 Bona vêya
ez ê we ji Şamê wê de sirgûn

[1] Saz, santûr, an jî: Çenk.

bikim! XUDAN dibêje, navê wî Xwedayê artêşan e.

*Wey li serê bêxeman*

Îşa 5,8-14; Aqûp 5,1-6

6 Wey li zilamên ku li Siyonê bêxem rûdinin û li çiyayê Samîriyê di ewledariyê de ne, ji zilamên hatiye nasîn yên yekema netewan, ji wan zilamên ku mala Îsraêlê bi wan re dişêwirin! 2 Derbasî Kalneyê bibin û bibînin û ji wir herin Hamata mezin û dakevin bajarê Gatê ya Filistiyan; ma ew ji van welatan hîn jî qenctir in? Û ma sînorên wan ji sînorê we firehtir in?

3 Ya hûn yên ku roja asîwê ji xwe dûr dixînin û kursiya zordestiyê tînin nêzîkê! 4 Ya hûn yên li cîhên ji diranên fîlê ye radikevin û yên ku li ser sedîran dirêj dibin û yên ku ji keriyê berxikan û ji hundirê axurê golikan radihêjin û dixwin; 5 yên ku bi dengê santûrê sitranên vala dibêjin; yên ku wekî Dawid bin ji xwe re haletên muzîkê dahênan[1] dikin; 6 yên ku bi tasan xemrê vedixwin û rûnê herî qenc di xwe de didin û li ser şikestina Ûsiv nakesirin!

7 Ji ber vê yekê dê niha li serê sirgûnan bên sirgûn kirin û dê qêrînên bi kêf kesên ku li ser sedîrê dirêj bûne, bigihêje dawiyê. 8 Xudan, XUDAN li ser xwe sondê da, XUDAN, Xwedayê artêşan dibêje: Ez ji xirûra Aqûp dikerihim û ez ji qesrên wî nefret dikim û ez ê bajêr û yên ku di hundirê wê de ne bidim dest. 9 Û dê wusa bibe ku, ger di malekê de deh zilam mabe, dê ew ê jî bimirin. 10 Û apê mirovekî, zilamê ku dê cesedê bişewitîne, dema bona hestiyan ji malê derxîne wan bişewitîne û ji yê ku di aliyê hundirê malê de ye bibêje: Hîn li cem te heye? Û gava ew jî: Na bibêje, wê gavê dê bibêje: Hiş be! ji ber ku bîranîna navê XUDAN nabe. 11 Ji ber ku, a vay, XUDAN emir dide û dê xaniyê mezin xera bibe û dê xaniyê biçûk bi derizan ve xopan bibe.

12 Ma li ser zinaran hesp baz didin? Li wê derê tu kes bi ganêran ve cot dike? Ya rastî we mafê wergerandin ziravikê û mêwa dadiyê wergerandin gîhayê pelînê; 13 hûn, yên ku bi tunebûnekê kêfxweş dibin û: Ma me qiloçan bi quweta xwe ji xwe re negirtin? dibêjine.

14 Ji ber ku, a vay, ya mala Îsraêlê, ez ê li dijî we gelekî bişînim, Xwedayê artêşan XUDAN dibêje û ji cîhê ku ketina Hamatê heta newala Arabayê dê ew ê we biperçiqînin[2].

*Xewn û xeyalên Amos*

7 Xudan, XUDAN bi vî awayî nîşanî min da û a vay, çawa

1 Îcad.

2 An jî: Ew ê zordestiyê li we bikin.

ku mêrga dawîn dest bi derketinê
dikir, wî kulliyan çêdikir û a vay,
paşî çinandina qiral, mêrga dawîn
bû. 2 Û wusa bû ku, dema wan
xwarina gîhayê erdê qedandin
min got: Ya Xudan, XUDAN, ez
rica dikim, bibexşîne! dê Aqûp
çawa di berxwe de bide? Ji ber ku
biçûk e! 3 Li ser vê yekê XUDAN
poşman bû; XUDAN got: Dê ev
ê nebe!
4 Xudan, XUDAN bi vî awayî
nîşanî min da û a vay, Xudan,
XUDAN bona ku bi agir ve da-
razkirinê bang kir û agir balûpa-
la mezin xwar û qedand û li ser
xwarin û qedandina reşahiyê bû.
5 Û gotim: Ya Xudan, XUDAN,
ez rica dikim, berde! Ma dê Aqûp
çawa di ber xwe de bide? Ji ber ku
biçûk e! 6 Li ser vê yekê XUDAN
poşman bû; Xudan, XUDAN got:
Dê ev ê jî nebe!
7 Bi vî awayî nîşanî min da:
A vay, Xudan li cem dîwarê
qincî sekinîbû û di destê wî de
qinc hebû. 8 Û XUDAN ji min
re got: Ma tu çi dibînî Amos? Û
min got: Qincekî! Û XUDAN
got: A vay, ez ê qincê deynim
navenda gelê xwe Îsraêlê û êdî
carekê din ez ê çavên xwe jê re
negrim 9 û dê cîhên Îshaq yên bi-
lind xopan bibin û dê cîhên pîroz
yên Îsraêlê wêran bibin û ez ê
li dijî mala Yeroboam bi şûr ve
rabim!

*Amos û Amatsya*

10 Û kahînê Beytelê Amatsya ji
Yeroboamê qiralê Îsraêlê re şand
û got: Di navbera mala Îsraêlê de
Amos li dijî te duzenê danî; welat
nikare hemû gotinên wî bikişîne!
11 Ji ber ku Amos wusa dibêje: Dê
Yeroboam bi şûr bimire û helbet
ku dê Îsraêl ji ser axa xwe ve bête
ajotin! 12 Û Amatsya ji Amos re
got: Ya yê ku dibîne here! Bireve
warê Cihûda û li wir nan bixwe
û li wir peyxambertiyê bike; 13
lê belê carekî din li Beytelê pey-
xambertiyê neke; ji ber ku ev der
cîhê qiral yê pîroz û perestgeha
qiraletiyê ye!
14 Û Amos bersivê da û ji
Amatsya re got: Ez ne peyxamber
bûm, ne lawê peyxamber jî bûm;
lê ez gavanê dewaran bûm û dar-
ên hêjîran yên bejî tîmar dikirim
15 û XUDAN min ji paşî keriyê
rahişt û XUDAN ji min re got:
Here û ji netewa min Îsraêlê re
peyxambertiyê bike! 16 Û niha
gotina XUDAN guhdarî bike,
tu dibêjî: Li dijî Îsraêlê peyxam-
bertiyê neke û li dijî mala Îshaq
gotinê nebêje! 17 Ji ber vê yekê
XUDAN wusa dibêje: Dê jina
te li bajêr bibe fahîşe û dê law û
qîzên te bi şûr ve bikevin û dê axa
te bi tayê pîvanê ve bête par kirin
û tuyê li ser axa mindar bimirî û
helbet ku dê Îsraêl ji ser axa xwe
ve bête ajotin!

*Selikek Fêkî*

8 Xudan, XUDAN bi vî awayî
nîşanî min da: Û a vay, selikek
fêkiyên havînê. 2 Û got: Ma tu çi
dibînî, Amos? Û min got: Selikek
fêkiyên havînê! Û XUDAN ji
min re got: Dawiya netewa min
Îsraêlê hat, êdî carekî din ez ê ça-
vên xwe ji wan re negirim! 3 Û
dê wê rojê kilamên qesrê vegerin
urînê, Xudan, XUDAN dibêje; dê
laş zêde bibin; dê li her derê wan
bi bêdengî bavêjin derve!
4 Vêya guhdarî bikin, hûn yên
ku dixwazin xizanan daqurtînin
û hûn feqîrên welêt xopan dikin
5 û dibêjin: Dê kengê serê mehê
derbas bibe ku em zad bifroşin? Û
ka dê kengê roja Sebtê derbas bibe
ku, em genim derxînin firotinê, em
efayê[1] biçûk bikin û şekelê[2] mezin
bikin û bi tereziyên bi fen biwe-
zinîn ku 6 feqîran bi zîv û xizanan
bi cotekî çaroxê bistînin û gihûra
genim[3] bifroşin? 7 XUDAN li ser
yê ku Aqûp pê re pesnê xwe dida,
sond xwar: Ez ê hemû karên wan
abadîn ji bîr nekim! 8 Ma dê ji ber
vêya erd nelerize û her zilamê ku
tê de rûdinê dê şînê negirin? Belê,
dê hemû erd mîna Nîlê bilind
bibe, mîna çemê Misirê dê rabe û
dîsa dakeve. 9 Û dê di wê rojê de
wusa bibe ku, Xudan, XUDAN
dibêje, ez ê nîvrojê rojê bibim ava
û di navbera rojê de ez ê warê tarî
bikim. 10 Û ez ê cejnên we wer-
gerînim şînê û hemû qesîdeyên we
bizivirînim lawijan û ez ê cilikê[4]
di her piştê de bidim pêçandin û
porê her seriyî birûçikînim û ez ê
wê mîna şîna lawê tekane û dawi-
ya wê bikim mîna rojek tahl.
11 A vay, roj tên, Xudan, XUDAN
dibêje û ez ê birçîbûnê bişînim
welêt, ne birçîbûna ji nan re û ne
tîbûna ji avê re, tenê tîbûna ji bihîs-
tina gotinên XUDAN re bişînim.
12 Û dê ji behrê heta behrê û ji bakur
heta rojhilatê bigerin; bona li gotina
XUDAN bigerin, dê bi vir û wir de
bazdin û dê nebînin. 13 Wê rojê jî
dê qîzên xweşik û egîdan ji tîbûnê
ji bîr ve biçin. 14 Ewên ku, li ser
gunehê Samîriyê sondê dixwin û:
Ya Dan, li ser jiyana îlahê te! û: Li
ser jiyana rêya Beer-Şeba! dibêjin;
dê ew ê bikevin û êdî ranebin!

*Îsraêl tête cezakirin*

9 XUDAN li cem pêşkêşîgehê
ve sekinî dîtim û got: Li serî-
kan bixe ku bila şêmûg bilerizin
û li ser seriyên hemûyan wan bi-
perçiqînin û ez ê yên ji ber wan
mayîne bi şûr bukujim; dê revokê
wan nereve û dê xelasbûyên wan
nikaribin xelas bibin!

---

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 Jibermayiya genim.
4 Çûl.

2 Warê miriyan qul bikin û bike-
vinê jî, dê destê min wan ji wir
rahêje û hilkişin ezmanan jî, ez ê
wan ji wir daxînim. 3 Û ger di girê
Karmelê de xwe veşêrin jî, ez ê li
wan bigerim û wan ji wir rahêlim
û ji ber çavê min dûr, di bin behrê
de jî xwe veşêrin, ez ê ji wir emir
li mar bikim û dê bi wan vede. 4 Û
ji ber neyarên xwe bi sirgûnî biçin
jî, ez ê ji wir emir li şûr bikim û dê
wan bikuje û ez ê ne bona qenciyê
lê bona xerabiyê, çavên xwe zîq li
nêrîna wan deynim!
5 Ji ber ku XUDAN, Xudanê
artêşan, yê ku destê xwe bi erdê ve
dide ew e û erd duhule û yên ku di
wê de rûdinin, dê hemû şînê bigirin
û dê hemûya erdê mîna Nîlê rabe
û mîna çemê Misirê dê dîsa dake-
ve; 6 yê ku odeyên xwe yî jorîn li
ezmanan ava kiriye û quba xwe li
ser erdê daniye û yê ku bangî avên
behrê dike û wan li rûyê erdê diri-
jîne ew e; navê wî XUDAN e.
7 Ma hûn bona min ne mîna lawên
Hebeş in, ya lawên Îsraêlê? Gotina
XUDAN. Ma min Îsraêlê ji warê
Misirê û Filistiyan ji Kaftorê û
Sûriyeyiyan jî ji Kîrê dernexistin?
8 A vay, çavên Xudan, XUDAN
li ser vî welatê bisûc e û ez ê wê
ji rûyê erdê rakim û bavêjim; lê
ez mala Aqûp bi tûmî ranakim
û navêjim, gotina XUDAN. 9 Ji
ber ku a vay, ez ê emir bidim û di
nav hemû neteweyan de, mîna ku
di bêjingê de genim bête bêjing
kirin, ez ê mala Îsraêlê bêjing
bikim û dê tenê yek jî nekeve erdê!
10 Ji netewa min hemûyên ku sûc
kirine, yên ku: Asîw nagihêje me û
dernakeve pêşiya me dibêjin, dê bi
şûr ve bimirin!

*Îsraêl dîsa vedigere XUDAN*

Yow 4,18-21

11 Ez ê wê rojê çardaxa Dawid ya
ku ketiye biçikînim û ez ê neqebên
wê dagirim û cîhên wê yî xerabûyî
çêbikim[1] û ez ê wê bikim mîna ro-
jên berê; 12 da ku, bila maweya
Edomê û hemû neteweyên ku navê
min li ser wan tête bang kirin, bila
ji xwe re bikin milk, XUDANê ku
vêya kiriye dibêje. 13 A vay, roj tên,
gotina XUDAN, yê ku cot dike, dê
bigihêje dasvan û yê ku tirî dadi-
wisîne, dê bigihêje yê çandina zad
dike û dê çiya xemra nû dilop bikin
û dê hemûyên giran buhulin. 14 Û
ez ê sirgûnên netewa xwe Îsraêlê
şunda bînim û dê welatê ku xopan
bûyîne ava bikin û dê di wan de
rûnin û dê rezan biçikînin û xemrên
wan vexwin û dê bexçeyan çêbikin
û mêwên[2] wan bixwin. 15 Û ez ê
wan biçikînim axên wan û êdî dê
ji axa ku dame wan neyên rakirin!
Xwedayê te XUDAN dibêje.

---

1 Biselihînim, restore bikim, an jî: Tamîr bikim.

2 Fêkî, ber, an jî: Meywe.

# OBADYA

*Pêşgotin*

Pirtûk, B.Z. di sala 586'an de piştî ku Babîloniyan Orşelîmê bi dest ve xistin, hate nivîsandin. Edomiyên ku ji nîjada Esavê neyarê Cihûda hatine, tenê bi şabûna ketina Orşelîmê neman, di ser de bi halê xerab yê Cihûda qerf û qotên xwe kirin û bi talankirina bajêr, bûn alîkirê dagirkeran. Obadya jî di derheqê Edomê de, ji aliyê neyarê din yê Îsraêlê ve dê were mexlûb kirin û biceza kirin, peyxamberiyê kir.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1-14 | Bicezakirina Edom |
| 15-21 | Roja Xudan |

*Dê XUDAN Edom biceza bike*

Yêr 49,7-22; Hêz 25,12-14; 35; Îşa 34

1 Xewn û xeyalê Obadya:
Xudan, XUDAN, bona Edomê ûsa dibêje: Me ji XUDAN, xeberekî bihîst û bona ku em rabin û bona li hemberî wî cengê bikin rabin! ji netewan re nûçegihanek hate şandin: 2 A vay, min te di
nava netewan de biçûk kir; tu bi gellekî biçûk têtê dîtin. 3 Ya tu,
yê di kovikê zinaran de rûdine, yê cîhê wî bilind, quretiya dilê te, te xapandiye; ya ku di dilê te de dibêje: Kî yê dê min daxe erdê?
4 Ger tu mîna qertelê bilind bibe û hêlîna xwe[1] dayne nava sitêrkan jî, ez ê te ji wir daxînim! XUDAN dibêje.
5 Ger diz û rêbirên şevê bihatana te, (tu çawa helaq bû!) Ma dê wan têra xwe ranehiştina? Ger rezvan bihatana cem te, dê li pêy xwe çend goşiyî nehiştina? 6 Çawa
her tiştên Esavê vedan! Çawa xezîneyên wê yên veşartî derxistin
qadê! 7 Heçî zilamên ku peymanê bi te re çêkiribûn, çawa te gîhandin sînorê; zilamên bi te re biaştî ne[2] te xapandin û mexlûp kirin; zilamên ku nanê te dixwin, dafikê davêjin bin te. Di wî de sehîkerî nîne! 8 XUDAN dibêje ku: Ma ez ê wê rojê, zilamên bi zanyarî ji

1 Mala xwe.

2 Li hev hatine, an jî: Bi te re peyman danîne.

Edomê û sehîkeriyê ji çiyayê Esav
tune nekim? 9 Bona ku her kes bi
kuştinê ji çiyayê Esav bê jêkirin û
avêtin, ya Teman, dê çavê egîdên
te bitirsin.
10 Ji ber zordestiya ku ji birayê te
Aqûp re kirine, dê şermezarî bi te
bigire û tuyê bi bêdawîbûnê bê jê-
kirin û avêtin! 11 Roja ku tu li ber
sekinî û roja ku yên biyan malên
wî ajotin û yên xerîb ketin deriyê
wê û bona Orşelîmê pişkê avêtin,
tu jî bû mîna yekî ku ji wan e!
12 Lê belê li roja birayê xwe, li
roja bextereş ya birayê xwe ne-
nihêre û di roja asîwên wî de, li
ser lawên Cihûda kêfxweş nebe û
di roja tengasiyê de, gotina mezin
nebêje. 13 Di roja asîwa wan de,
ji deriyê qewma min ve derbas
nebe û him jî tu, di roja asîwa wan
de li derdê wan nenihêre û di roja
asîwên wan de destên xwe dirêjî
malên wan neke. 14 Bona jêkirin
û avêtina revokên wî jî, li ber rê
nesekine û di roja tengasiya wî de,
yên ji wî xelas bûne, nede dest!

*Dê Xwedê Neteweyan daraz bike*

15 Ji ber ku, bona hemûya ge-
lan roja XUDAN nêzîk e. Ger te
çawa kiribe, dê li te ûsa bê kirin.
Dê berdêla kirinên te, vegere ser
serê te! 16 Ji ber ku we çawa li ser
çiyayê minî pîroz vexwaribin, dê
hemûya neteweyan jî her tim ûsa
vexwin. Belê, dê vexwin û bimêjin
û dê bibin mîna ku tune ne.

*Li dijî Edomê Serfiraziya Îsraêl*
L.Yêr 4,21-22

17 Lê belê dê yên ji Çiyayê Si-
yonê birevin û xelas bibin hebin û
dê ew pîroz bibin û dê mala Aqûp
bikin milkên xwe. 18 Û dê mala
Aqûp bibe agirek û mala Ûsiv
pêtek û mala Esav jî bibe firêze.
Dê wan bişewitînin û dê wan bi-
xwin û biqedînin. Dê bona mala
Esav, yekî jî ji bermayî nemîne; ji
ber ku XUDAN got! 19 Û yên li
başûr in[1], dê çiyayê Esavê û yên li
Şefêla[2] ne jî dê Filistiyê ji xwe re
bikin milk. Û dê beyarên Efrayîm
û Samîriyê ji xwe re bikin milk.
Dê Benyamîn jî Gîleadê ji xwe
re bike milk. 20 Û ev sirgûnên di
nav Kenaniyan de ne, ji yê artêşa
lawên Îsraêlê ne, dê heta Tisarêfa-
tayê ji xwe re bikin milk. Û sir-
gûnê Orşelîmê, yên ku li Sefaradê
ne, dê bajarên başûrê ji xwe re
bikin milk. 21 Û bona daraziyê
bidin çiyayê Esavê, dê xelasker
derkevin Çiyayê Siyonê û dê qi-
raletî bibe ya XUDAN!

---

[1] Bi Îbranîtî Negeb, aliyê başûrê Cihûdayê ye.
[2] Şefêla: Cîhê çiyayî, yê ku li rojhilata zozana qeraxê ye.

# YÛNIS

*Pêşgotin*

Pirtûka Yûnis, ji pirtûkên din yên Kitêba Pîroz ve cihêtiyekê nîşan dide. Çîrokek serpêhatiyên peyxamberekî ji emirê Xwedê direve tîne ziman. Xwedê emir kir ku Yûnis here Neynowaya serbajarê Asûrê neyarê Îsraêlê yê xedar e. Lê belê Yûnis nexwest ku here wir û gotinên Xwedê bighîne. Ji ber zanîbû ku Xwedê dê wan tune neke. Paşî tiştên ku hatin serê wî, bi bêdilî ji Xwedê re îtaet kir. Ya dawîn, aqûbeta xerab ya ku ji gel re gîhandiye dema çênebû, wecê xwe daliqand. Pirtûk di derbarê hêza Xwedê ya bê dawî, ya ku li ser aferîdeyên wî (Xwedê) de ye. Lê belê Xwedê, berî her tiştî, ji bilî Xwedayek cezakir û tunekir e, Xwedayek mîna heta neyarên gelê xwe jî dibexşîne, xelas dike û hez dike tête danasîn.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-17 | Banga Yûnis û bêîtaetiya wî |
| 2:1-10 | Duaya Yûnis û xelasbûna wî |
| 3:1-10 | Belavoka Yûnis ya li dijî Neynowayê |
| 4:1-11 | Dilê Xwedê bi Neynowayê dişewite |

*Yûnis ji Xwedê ve direve*

1 Û vê gotina XUDAN, ji Yûnisê lawê Amîttay re hat: 2
Rabe, here Neynowayê, wî bajarê mezin û li dijî wê bang bike: Ji ber ku xerabiya wan, derket heta pêşiya min! 3 Lê belê Yûnis
xwest ku ji ber XUDAN bireve Tarşîşê û daket Yafayê. Keştiyek diçe Tarşîşê dît; heqê birina xwe da û bona ku ji ber XUDAN dûr ve here Tarşîşê, bi wan re li keştiyê siwar bû.
4 Û XUDAN, bayek mezin şand ser behrê, di behrê de bahozek mezin çêbû û hema mabû ku keştî perçe bûbûna[1].
5 Keştîvan tirsiyan, her yek ji îlahê xwe re qêriyan û bona ji wan re sivikî bibe, her tiştê di keştiyê de ne avêtin behrê. Lê Yûnis jî daketibû embara binî ya keştiyê û raketibû

*1* An jî: Mîna bişkesta bû.

û ketibû xewekî giran. 6 Serekê
keştiyê nêzîkî wî bû û jê re got:
Ya tu, zilamê radikeve, çiyî te
heye? Rabe, bangî Xwedayê xwe
bike, dibe ku Xwedê me di bîr
bîne û em helaq nebin! 7 Her kesî
ji hev û din re gotin: Werin, em
pişkê bikişînin û bizanibin ku ev
belaya, bona kî hatiye serê me.
Pişkê avêtin û pişk ji Yûnis re ket.
8 Wê wextê ji wî re gotin: Em rica
dikin, ji me re bibêje; ev belaya
ku li ser me ye ji ber kî ye? Karê
te çî ye? Tu ji ku tê? Welatê te
kîjan e? Û tu ji kîjan qewmê yî?
9 Wî ji wan re got: Ez Îbranî me;
ji XUDAN Xwedayê ezmanan,
yê ku girav û behran afirandiye
ditirsim. 10 Ew zilamana pirr tir-
siyan û ji wî re gotin: Ev kirina te
çi ye? Wan zilaman dizanîbûn ku
ew ji ber XUDAN direve, ji ber
ku ji wan re gotibû.
11 Ji wî re gotin: Bona ku behr
li dijî me aş bibe, ka em çi bi te
bikin? Ji ber ku behr, her ku diçû
bi bahoz dibû. 12 Wî ji wan re
got: Min rakin û bavêjin behrê;
dê wê demê behr li dijî we aş
bibe; ji ber ez dizanim ku bona
min ev bahoza mezin bi ser we ve
hat! 13 Lê belê wan zilaman bona
ku vegerin giravê, bi hemû hêza
xwe bêran kişandin. Lê belê ji
destê wan nehat; ji ber, her ku
diçû, behr hîn jî bi bahoz dibû.
14 Û bangî XUDAN kirin û go-
tin: Ax, ya XUDAN, em lava
dikin, em ji ber canê vî zilamî
helaq nebin û xwîna bêsûc li ser
me neke bargiranî; ji ber ku tu, ya
XUDAN, çawa bi te xweş hatibe
xûyabûn, te ûsa kir! 15 Û rabûn
û Yûnis avêtin behrê û harbûna
behrê aş bû. 16 Wê demê van
zilaman pirr ji XUDAN tirsiyan;
qurbanan bona XUDAN serjê ki-
rin û qewlan dan.
17 Û XUDAN, bona Yûnis daqur-
tîne, masiyek mezin amade kir. Û
Yûnis, sê roj û sê şev di zikê ma-
siyê de ma.

*Duaya Yûnis*
Met 12,38-40

2 Yûnis ji zikê masiyê ve ji
Xwedayê xwe XUDAN re
dua kir û got:
2 Di nava tengasiya xwe de bangî
XUDAN kirim û bersivê da min.
Ji sînga warê miriyan ve bangî alî-
kariyê kirim û te dengê min bihîst!
3 Ji ber ku te min avêt balûpalê,
nava dilê behrê û şêlav dora min
girtin; hemû şepêl û pêlên te, ji ser
min ve derbas bûn! 4 Gotim: Ez
ji ber çavên te hatim qewirandin;
lê belê ez ê dîsa li perestgeha te
yî pîroz binêrim! 5 Av dora min
girtin, ta heta can (ê min)[1] balûpal
dora min girt. Kevzan li serê min
geriyan!

[1] An jî: Heta ku min bexeniqînin.

6 Ez daketim heta koka çiyayan, ji
paşî min dinya, heta bêdawîbûnê
hate zend û bend kirin.
Lê belê te jiyana min ji kortalê der-
xist, ya Xwedayê min XUDAN.
7 Dema di hundirê min de canê
min ji bîr ve çû, XUDAN bi bîr
ve anîm û dua min gîhaşt te, heta
hundirê perestgeha te!
8 Yên hurmeta wan ji pûtên de-
rewîn re hene, nahmetên xwe ber-
didin.
9 Lê belê ez ê bi dengê şikiryê
qurbanê ji te re serjê bikim, ya ku
qewil kirime, ez ê bidim.
Xelaskirin ya XUDAN e!
10 XUDAN ji masiyê re got û
masî, li reşayiyê Yûnis verşiya[1].

*Banga Yûnis û tobekirina Gel*

Lûq 11,32; Yêr 18,7-8

3 Cara dudiyan, vê gotina
XUDAN ji Yûnis re hat:
2 Rabe, here Neynowayê, wî
bajarê mezin û gotinên ku ez ê
ji te re bibêjim, ji wê re bang
bike. 3 Yûnis rabû û li gor go-
tina XUDAN çû Neynowayê.
Neynowa bajarekî zehf mezin
bû, firehiya wê rêya sê rojî bû.
4 Û Yûnis dest bi ketina bajêr
kir, rêya rojekê meşiya û bang
kir û got: Hîn çel roj heye, dê
Neynowayê xera bibe!
5 Gelê Neynowayê baweriyê bi
Xwedê re anîn û rojiyê bang ki-
rin[2]. Ji mezin, heta biçûkên wan
cilikan[3] li xwe pêçandin. 6 Vê
gotina, gîhaşt qiralê Neynowayê.
Ji textê rabû, qeftanê xwe der-
xist, cilikan li xwe pêçand û li ser
xweliyê rûnişt. 7 Bi fermana qiral
û zilamên wî yên mezin, li Ney-
nowayê bang kirin û dan bihîs-
tin: Bila mirov û heywan, ga û
dewar, tiştekî tam nekin, neçêrin
û avê jî venexwin! 8 Û bila mi-
rov jî, heywan jî cilikan li xwe
bigerînin û bihêz bangî Xwedê
bikin. Bila her kes ji rêya xwe yî
xerab û ji zordariya di destên xwe
de yî vegere! 9 Kî dizane? Dibe
ku Xwedê vegere û poşîman bibe
û ji hêrsa xwe yî tirsehêz vegere,
em jî tune nebin! 10 Xwedê karên
wan û vegera wanî ji rêya xerab
dît û ji ber xerabiya ku gotibû, dê
bi wan bike, Xwedê poşîman bû
û wê nekir.

*Yûnis li dijî Dilovaniya XUDAN hêrs dikeve*

4 Lê belê pirr bi zora Yûnis çû
û ew hêrs bû. 2 Ji XUDAN re
dua kir û got: Ax, ya XUDAN!
Ma dema ez hîn li welatê xwe
bûm, vêya negotim? Ji ber vêya,
hema ber bi Tarşîşê ve reviyam. Ji

*1* Verşiya reşayiyê, an jî: Avêt ji derve.
*2* Îlan kirin.
*3* Çûl.

ber, dizanîbûm ku, tu Xwedayek
keremkar[1] û dilovan î, yê dereng
hêrs dibî û bexşandina wî zêde
yî û ji xerabiyê poşîman dibe yî.
3 Lê ya XUDAN, ez li ber te di-
gerim, canê min ji min bistîne; ji
ber ku mirin, bona min ji jiyanê
qenctir e! 4 Û XUDAN got: Ma
qey tu bi hêrsbûnê qenc dikî?
5 Yûnis ji bajêr ve derket û li ro-
jhilata bajêr ve rûnişt û li wir, ji
xwe re çardaxekê ava kir û di bin
wê de, li siyê rûnişt, da ku bibîne,
ka dê çi ji bajêr re bibe.
6 XUDAN Xwedê, bona ku Yû-
nis ji wê rewşa wî yî xerab xelas
bike û jê re bibe sî, şiva kundirê
dalîtê amade kir û derxist ser wî.
Yûnis, ji ber kundirê dalîtê bi
kêfxweşiyek mezin kêfxweş bû.
7 Lê belê, roja din, dema dibû
sibe, Xwedê kurmikek amade kir
û kurm li kundirê dalîtê xist û ew
hişk bû. 8 Û sirûş bû ku, dema
roj hilat, Xwedê bayê başûrê yê
ku dişewitîne[2] amade kir. Rojê[3] li
serê Yûnis xist û hiş ji serê wî çû
û ew ket. Bona xwe mirinê xwest
û got: Bona min mirin, ji jiyanê
ve qenctir e!
9 Xwedê pirsa: Gelo tu bi xeyida
ku bona kundirê dalîtê hêrs dibe,
qenc dikî? ji Yûnis pirsî. Wî jî got:
Ez bi heta mirinê hêrs bûnê ve qenc
dikim! 10 Û XUDAN got: Heyfa
te li kundira dalît ya ku te kedê ne-
dayê û wê mezin nekiriye tê. Ew
kundira ku di şevekê de derket û
di şevekê de jî tune bû 11 û ez, qey
bila heyfa min li Neynowayê, li wî
bajarê mezin nê? Ew bajarê ku, li
wir ji sed û bîst hezarî zêdetir mi-
rovên hîn çep û rastên xwe nizanin
hene û gellek jî heywan hene!

---

1 Lutifkar, qencîker, an jî: Xêrxwaz.
2 Diqemirîne.
3 Tavê.

# MÎKA

*Pêşgotin*

Peyxamber Mîka, bi Îşaya re di yek demê de jiya. Li bajarekî Cihûda ya gundewarî hatibû dinê. Gellekî bawer dikir ku dê bêtariyek mîna bêtariya netewî ya ku Amos ji qiraletiya bakur re gîhandibû, were serê Cihûda ya qiraletiya başûr jî. Dê Xwedê ji ber bêîtaetiyê gel bi ceza bikira. Lê li ber vêya peyxambertiya Mîka, di derbarê hatinê de hêvîyek zelal û vekirî wad dikir. Pirtûk aştiya gerdûn ya ku di serweriya Xwedê de yî derdixîne pêşiyê (4:1-4); têdigehand ku dê qiralê bilind ji nîjada Dawid derkeve û aşitiyê ji netewê re bîne (5:2-5a). Ya dîn ayetek jî gotina ku peyxamberên Îsraêlê dixwazin bibêjin, bi vî awayî kurt dikir (6:8): "Xeynî bidadî kirina we, ji dilsoziyê hezkirina we û bi dilnizmî di rêya wî de meşîna we, ma Xwedayê we XUDAN ji we çi xwest?"

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-3:12 | Daraziya Cihûda û Îsraêl |
| 4:1-5:15 | Nûbûn û aşitî |
| 6:1-7:20 | Belavoka hêvî û îkazê |

*Daraziya Samîriyê û Orşelîmê*

1 Di rojên qiralên Cihûda; Yotam, Ahaz û Hizkiya de,
gotina XUDAN, ya ku ji Mîkayê
Moraşetî re hatiye yî; wî di der-
heqê Samîriyê û Orşelîmê de dît:
2 Ya neteweno, hûn gişt bibihîzin;
ya dinya û hemûyên di hundirê
wê de ne; baş guhdarî bikin! Û
Xudan, XUDAN, bila Xudan, ji
perestgeha xwe yî pîroz li hem-
berê we şahde bibe! 3 Ji ber ku a
vay, XUDAN ji cîhê xwe ve der-
dikeve. Dê dakeve û li ser cîhên
bilind yên dinê bimeşe. 4 Dê çiya
û newal di bin wî de, mîna şimaya
li ber agir an jî mîna ava ku li da-
ketinê hatiye rijandin, dê buhulîn
û biqelişin. 5 Hemû ev tişta, ji ber
gunehên Aqûp in. Û ji ber sûcên
mala Îsraêlê ne. Gunehê Aqûp çi
ye? Ma ne Samîriye ye? Û cîhên
Cihûda yên bilind ku der in? Ma
ne Orşelîm e? 6 Ez ê Samîriyê

bikim mîna koma kevirên zeviyê û mîna cîhê ku rez tê de tên çêkirin. Ez ê kevirên wê birijînim çemê û bingehên wê vekim. 7 Dê li pûtên wê yên bi vedandinê hatine çêkirin, bixin û perçe perçe bikin û hemû xelatên zinê dê bi agir bêne şewitandin û ez ê hemû pûtên wê wêran bikim; ji ber ku qahpik wan bi heqê firotana xwe da hev û dê vegerin heqê firotana qahpikê!

8 Ji ber vêya ez ê li xwe bixim û biqûrim. Ez ê kinc ji xwe kirî û bi tazîtî bigerim; mîna çeqelan biqêrim û mîna heştirme xwe biperpitînim. 9 Ji ber ku birînên wê şîfa nabînin; ji ber ku hate heta Cihûdayê, digihêje heta deriyê netewa min, Orşelîmê.

*Neyar nêzîkê Orşelîmê dibe*

10 Ji Gat re nebêjin, qet negirîn; li Beyt-Leafrayê[1] di nava tozê de vegevize! 11 Ya tu, yê di Şafîrê de rûdine, bi tazîtî, di nava şermiyê de derbas bibe; yekî ku li Tsaananê rûnê demeket. Perpitandina Beyt-Etsel, piştgira xwe ji we digire! 12 Ji ber ku yê li Marotê rûdine, bona malên xwe dilerize, ji ber ku bela ji XUDAN ve daket heta deriyê Orşelîmê. 13 Ya tu, yê ku li Lakîşê rûdinî! Hespê xwe yî pêşbaziyê bibezîne erebê; bona keça Siyonê ev bû destpêka sûcê; ji ber ku gunehên Îsraêlê di te de hatin dîtin. 14 Ji ber vêya, tuyê xelata cudabûnê bide Moreşet-Gatê. Dê malên Akzîb, bona qiralên Îsraêlê bibe tiştekî xapînokî[2]. 15 Ya tu, yê ku li Marêşayê rûniştî, zilamê ku te ji xwe re bike milk, dîsa ji te re bînim. Dê mezintiya Îsraêlê, were heta Adûlamê. 16 Bona lawên xwe yî xoşewîst, porê xwe birûçikîne û jêke; mîna sîmerkê keçeliya serê xwe fireh bike! Ji ber ku, dê ew ji cem te ve bên sirgûn kirin[3].

*Bicezakirina Mêtîngerên Gel*

2 Wey li serê yên ku li ser livînên xwe fesadiyê xiyal dikin[4] û pêşniyariyê dikin! Dema sibeh gewr dibe ew vêya dikin, ji ber ku, ji destên wan tê. 2 Û çav ber didin zeviyan û wan bi zorê distînin. Çav ber didin xaniyan jî û wan jî distînin. Û li dijî xwediyê xanî û xaniyê wî, li dijî zilam û mêrasa wî zordariyê dikin. 3 Ji ber vêya, XUDAN ûsa dibêje: A vay, ez li dijî vê eşîrê pêşniyara belayekî ûsa dikim ku, hûn ê nikaribin histuyê xwe ji wê bikişînin û hûn ê nikaribin bi ser bilindî bimeşin. Ji ber ku, demekî xerab e! 4 Dê di wê rojê de, methelo-

1 Mala tozê.
2 Bi Îbranîtî; Akzaab.
3 Qewirandin, ajotin, an jî: Ji sirgûnê re bên şandin.
4 Rêz dikin, difikirin, an jî: Tesewir dikin.

kekê li dijî we bibêjin û lawijekê
şîndar bixwînin û bibêjin: Em bi
tûmî wêran bûn; para netewa min
dide destekî din; wê çawa ji destê
min distîne! Zeviyên me bi par-
bûnê belavî xayînan dike! 5 Dê ji
ber vêya, tu kesekî te yî di civata
XUDAN de tayê pîvanê bi peşkê
ve bavêje, tune be.
6 Bi gotina: Peyxambertiyê ne-
kin, peyxambertiyê dikin. Dê ji
vana re peyxambertiyê nekin;
dê dawiya pekandinan qut nebe.
7 Ya tuyê, ku jê re dibêjin mala
Aqûp, ma XUDAN bêsebir e?
Ma vana karên wî ne? Ma gotinên
min, ji yê ku rast dimeşe re qenci-
yê nakin? 8 Lê belê hîn doh, nete-
wa min bi neyarî serî hilda. Hûn
ji ser kincên kesê ku ji cengê ve
vedigerin û bêxem derbas dibin,
sakoyê wan derdixin, distînin. 9
Hûn pîrekên netewa min, ji malên
wanî rehet diqewirînin. Hûn, me-
zintiya min, heta bêdawîbûnê ji
ser zarokên wanî biçûk distînin.
10 Rabin û herin! ji ber ku vir ne
cîhê we yî rawestinê ye. Dê ev
cîh ji ber mindariyê helaq bibe
û helaqî dijwar e. 11 Ger zila-
mek, bi ruhê fenekiyê ve bimeşe
û derewan bibêje û: Ez ji te re di
derheqê xemr û vexwarinan de
peyxambertî bikim bibêje, ew ê jî
bibe peyxamberê vê netewê!

*Mizgîniya Xelasiyê*

Yêr 23,3

12 Ya Aqûp; helbet ez ê we bînim
cem hev; helbet ez ê bermayiyê
Îsraêlê bidim hev, ez ê wan mîna
mîhên Bosra, mîna keriyekî di
nava çêregeha xwe de ne, bînim
cem hev. Dê ji pirraniya mirovan
galegalek mezin bikin. 13 Yên
qulê vedikin, di pêşiya wan de
derdikevin; qulê vedikin û der-
basî derî dibin û ji wê derdikevin.
Û qiralên wan di pêşiya wan de û
XUDAN ji serê wan derbas dibe.

*Sûcê Pêşeng û Peyxamberan*

Yêr 23,1-2.9-32

3 Û gotim: Guhdarî bikin, ez
rica dikim, ya serekên Aqûp û
serdestên mala Îsraêlê! Ma nasiya
mafê, ne karê we ye[1]? 2 Hûn ku,
ji yê qenciyê dikerihin û ji yê xe-
rab hez dikin; ji ser wan çermên
wan û ji ser hestiyên wan goştên
wan diqeşêrin! 3 Û ew, goştên ne-
tewa min dixwin û ji ser wan çer-
mên wan dugurin û hestiyên wan
dişikînin. Û wekî ji beroşê re be û
wan mîna goştên di qazanê de ye
hûr dikin. 4 Wê demê, ew ê qêrînê
ji XUDAN re bikin, lê belê dê ew
bersivê nede wan û wê çaxê ew ê
wecê xwe ji wan re buxumîne, ji
ber ku karên wî xerab kirin.
5 Ew peyxamberên ku gelê min
ji rê ve derxistin, bi diranên xwe
dev lê dikin û bi gotina: Aşitiyê

1 Ma bi we nakevî?

diqêrîn û cengê li dijî zilamê ku,
tiştekî naxe devê wan, vedikin.
Bona wan, XUDAN ûsa dibêje:
6 Ji bo hûn ji ber vêya xewn û xe-
yalê nebînin, dê ji we re bibe şev
û bona hûn remildariyê nekin,
dê ji we re tarî bibe û dê roj li ser
peyxamberan biçe ava û roj di ser
wan de tarî bibe. 7 Yên zana[1], dê
bên şermezar kirin û remildar bêne
rezîl kirin û dê gişt rîhên xwe[2]
buxumînin; ji ber ku ji Xwedê ve
bersiv nîne! 8 Lê belê ez, bona ku
gunehên Aqûp û sûcên Îsraêlê bi-
gihînim wan, bi Ruhê XUDAN, bi
hêz û maf û metirsiyê ve tijî me.
9 Ez rica dikim, ya serokên
mala Aqûp û serdestên mala Îs-
raêlê; guhdarî bikin; hûn ku, ji
mafê ve dikerihin û ji her ya rast
xwar dikin. 10 Siyonê bi xwînê
û Orşelîmê bi neheqiyê ve ava
dikin! 11 Serekên wê, bi bertîlê
ve serweriyê dajon, kahînên wê,
biheq didin hîn kirin û peyxam-
berên wê bona zîvan remildariyê
dikin û tevî vêya ew bi gotina: Ma
XUDAN ne di nava me de ye?
Xerabî bi ser me ve nayê! xwe di-
sipêrin XUDAN. 12 Bo vêya, dê
Siyon ji ber we, mîna zeviyê bê
ajotin û Orşelîm bibe xirba kevi-
ran û dê çiyayê perestgehê, bibe
mîna cîhên bilind yên daristanê!

### *Ciyayê XUDAN û Serweriya Mesîh*

Îşa 2,2-5; Zek 9,9-10

4 Di rojên dawîn de wusa bibe
ku, dê li serê çiyan, çiyayê
mala XUDAN bê zeximandin û
ji giran[3] ve hîn jî bi jor ve bilind
bibe û dê netewe, ber bi wê ve
biherikin. 2 Dê gellek netewe he-
rin û bibêjin: Werin, em derkevin
çiyayê XUDAN û mala Xwedayê
Aqûp. Dê rêyên xwe hînî me bike
û em ê di rêyên wî de bimeşin. Ji
ber ku dê zagon ji Siyonê û Go-
tina XUDAN ji Orşelîmê derke-
ve. 3 Dê di nava gellek netewan
de serweriyê bajo û di derheqê
gelên li dûr in de, dê biryarê bide.
Dê şûrên wan bike hesinê gîsinê
û rimên wan bike kêra rezvanan.
Dê gel li dijî gelî şûr raneke û êdî
hînî cengê nebin. 4 Lê belê dê her
kes di bin mêwa xwe de û di bin
darê xwe yî hêjîrê de rûnin û yê
ku wan bitirsîne tune be. Ji ber ku
devê XUDANê artêşan vêya got.
5 Ji ber ku hemûya neteweyan,
her yek bi navê îlahê xwe dimeşe,
em jî her tim û heta bêdawîbûnê,
bi navê Xwedayê xwe XUDAN
ve dimeşin!
6 XUDAN dibêje: Ez ê wê rojê
yê kûd bidim hev û ya ku hatiye
ajotin û ya ku perçiqandime, ez ê
bidim hev. 7 Ez ê yê kûd bikim

---

1 Yên dibînin.
2 Wecê xwe, an jî: Lêvê xwe.
3 Tepik, tûm.

bermayiyek, yê bi dûra ve hati-
ye avêtin jî bikim gelekî xwurt.
Û XUDAN li Çiyayê Siyonê, ji
niha, heta bêdawîbûnê dê li ser
wan qiraletiyê bike. 8 Û tu, ya qû-
leya keriyê; dê şaxê keçika Siyonê
were te û serweriya yekemîn, qi-
raletiya keça Orşelîmê were!
9 Bo çi niha tu bi dengekî bilind
diqêre? Ma di te de qiral nîne?
An jî yê ku şîretê da te tune bûye
ku, ûsa janên pîreka ku diweli-
dîne bi te girtin? 10 Mîna pîreka
ku dê biwelidîne janê bikşîne, ya
keçika Siyonê! Bona welidandinê
buşuxule; ji ber ku tuyê niha ji ba-
jêr ve derkeve û li beyarê rûnê û
tuyê heta Babîlê were. Li wir tuyê
bê azad kirin; dê XUDAN li wir,
te ji destên neyarên te xelas bike.
11 Û pirr gelên ku niha li dijî te
civiyane, dibêjin: Bila bê mindar
kirin û çavên me, heçî tiştên ku
dixwazin, bila li Siyonê bibînin!
12 Lê belê ew, bi ramanên XU-
DAN nizanin û şîreta wî fêhm
nakin. Ji ber ku ger çawa gorzan[1]
bona cîhê bênderê dabin ber hev,
wana jî ûsa dan ber hev. 13 Ya
keça Siyonê, rabe û bênderê bajo!
Ji ber ku ez ê qiloçên te bikim he-
sin û neynûkên te jî bikim tûnc.
Tuyê gellek netewan bieciqîne û
ez ê qezencê wan ji XUDAN re,
malên wan ji Xudanê dinê re tir-
xan bikim.

*Dê Mesîh ji Beytlehemê derkeve*

Îşa 9,5-6; Met 2,1-11

5 Ya keça[2] artêşan; tu bibe artêş;
dora me girtin; bi ço ve li lama
serwerê Îsraêlê ve xistin.
2 Û tu, ya Beytlehem-Efrata,
bona ku di nava hezarên Cihû-
da[3] de, biçûk bûye; zilamê ku
bona min bibe serwerê Îsraêlê,
dê ji te derkeve. Derketina wî ji
demên kevin, ji rojên berê ye. 3
Ji ber vêya, heta welidîna pîreka
ku dê biwelidîne, dê wan bide
dest û bermayiyên birayên wî,
dê vegerin lawên Îsraêl. 4 Dê ew
bisekine û bi hêza XUDAN, bi
rewnaqiya navê Xwedayê XU-
DANê xwe, keriyan bajo; dê li
cîhê xwe bisekinin, ji ber ku dê
niha ew heta serê erdê mezin
be. 5 Û ew zilama, dê bibe aşitî!
Dema yê Asûrî were welatê me
û gavê xwe bavêje qesrên me,
em ê li hemberî wî heft şivanî û
heyşt kesên ji serekên gel dey-
nin[4]. 6 Dê bi şûr ve warê Asûrê
û ji cîhê ku ketinê ve warê Nîm-
rodê xera bikin. Dema yê Asûrî
têkeve welatê me û lingê xwe ji
sînorê me bavêje hundir, dê ew
zilama me ji wî xelas bike. 7 Û

1 Qeflan, demedan.
2 Bajar.
3 An jî: Malbatên Cihûda.
4 Bisekinînin, an jî: Derxinin.

dê bermayiyên Aqûp, di nava pirr
neteweyan de, ji aliyê XUDAN
ve mîna xunavê, mîna barana
ku bona mirov dereng namîne û
ji bo zarokên mirovan nasekine
û dikeve ser gîhayan bibe. 8 Û
bermayiyê Aqûp, dê di nava ge-
lan de, di nava gellek netewan
de, di nava heywanên daristanê
de bibe mîna şêrekî, di nava keri-
yên mîhan de dê bibe mîna şêrekî
ciwan; ew şêr ku, ger derbas bibe
dicû û diperçiqîne û yê ku xelas
bike nabe. 9 Bila destê te, li ser
yên ku cîh li te teng dikin bilind
bibe û bila hemû neyarên te bên
jêkirin û avêtin!
10 Dê wê rojê wusa bibe ku, XU-
DAN dibêje[1], ez ê ji te hespên te
vekim û bavêjim û erebeyên te yî
cengê tune bikim. 11 Û ez ê ba-
jarên welatê te rakim û bavêjim
û hemû bircên te xera bikim. 12
Û ez ê ji destê te efsûnikên te
bigirim û bavêjim û êdî dê di te
de sêhrbaz tune bin. 13 Ez ê ji
te pûtên hatine necirandin û ke-
virên hatine çikandin bigirim
û bavêjim û êdî tuyê nikaribe
bi karên destê xwe ve biperize.
14 Û ez ê Aşerên te, ji te biqetî-
nim û bavêjim û bajarên te xera
bikim. 15 Û ez ê ji gelên ku guh
nadin gotinan bi hêrs û xeyidê ve
tolê bistînim.

[1] An jî: Gotina XUDAN.

*Daraziya XUDAN*

Yêr 2,4-7

6 Gotina ku XUDAN dibêje, niha
guhdarî bikin: Rabe, li ber çiya-
yan dozê veke û bila girr dengê te
bibihîzin! 2 Ya çiyano û bingehên
erdê yên nalerizin; doza XUDAN
guhdarî bikin! Ji ber ku doza XU-
DAN, bi netewa wî ve heye û wê
bi Îsraêlê ve bikoşe. 3 Ya netewa
min, min çi ji te re kiriye? Û bi çi
te westandime? Bersivê bide min!
4 Ji ber ku, min te ji warê Misirê
derxist û te ji mala dîlan xelas kir
û di pêşiya te de Mûsa, Harûn û
Mîryam şand! 5 Ya netewa min;
bona ku tu karên XUDAN yê rast
bizanibe, şîreta qiralê Moabê Ba-
lak û bersiva ku, Balamê lawê Beor
daye wî, niha di bîra xwe de bîne;
ya ku ji Şitîmê heta Gîlgalê bûye û
qewimiye di bira xwe de bîne!
6 Ez bi çi derkevim pêşiya XU-
DAN û li ber Xwedayê birêz
xwar bibim? Ma ez bi pêşkêşiyên
şewitandinê an jî bi golikê yek salî
derkevim ber wî? 7 Ma XUDAN,
bi hezaran ji beranan, bi deh he-
zaran ji seylavên rûnê dê dilxweş
bibe? Ma ez bona gunehê xwe,
lawê xwe yî pêşîn, bona sûcê canê
xwe berhema bedena xwe bidim?
8 Ya zilamo, yê qenc gîhand te û
xeynî kirina yê heq û hez kirina
dilovaniyê û bi dilnizmî, bi Xwe-
dayê xwe re meşandinê pêv, ma
XUDAN ji te çi dixwaze?

9 Dengê XUDAN, bangî bajêr dike
û zilamê bi zanyar ji navê te ditir-
se, yê ku dar û wê wezîfedar kiriye
guhdarî bikin! 10 Ma xezîneyên di
xerabiyê de hatiye berhev kirin û
pîvana kêm ya bi lanet hîn li mala
zilamê xerab e? 11 Ma ez ê ji yê ku,
pîvana xerab û kîsek kevirê pîvanê
yên bi hîle di destê wî de ne paqij
bihesibînim? 12 Ji ber ku di dewle-
mendan de gellek zordarî hene û
yên ku di wê de rûniştin derewan
gotin û zimanên wan, di devê wan
de xapînokî ne. 13 Ji ber vêya, min
jî bi lêxistina giran li te xist; ji ber
sûcên te, te xera kirim. 14 Tuyê
bixwe, lê belê têr nebe û hundirê
te dê vala bimîne. Tuyê bide ber
hev, lê belê nikaribe xelas bike û ez
ê, ya ku te xelas kiriye bidim şûr.
15 Tuyê çandinê bike, lê belê çinînê
neke; zeytûnê dagire, lê belê nikari-
be rûnê di xwe de bide; tirî dagire,
lê belê nikaribe xemrê vexwe! 16 Ji
ber, bona ku te bidim perîşaniyê û
bona bi yên ku li wir rûdinin re bifî-
kin, emirên Omrî û hemûya karên
mala Ahab tê girtin û hûn di şîretên
wan de dimeşin û hûn ê şermezariya
netewa min jî hilgirin.

*Lawija Mîka*
Zeb 12,2-6

7 Wey li serê min! Ji ber ku
bermayiya rezçinînê di dema
komcivandina fêkiyên havînê de
çawa be, rewşa min jî ûsa ye! Qet
goşiyek xwarinê jî nîne; canê min
bêriya hêjîra nûber dike û nîne!
2 Yê qenc ji dinê tune bû û di nava
mirovan de zilamê rast nîne. Gişt
ji bo xwîn rijandinê di kemînê de
ne; her kes bona birayê xwe dafi-
kê ava dike. 3 Di karê xerab de,
destên wan bi xîret e, Serek xe-
latê dixwaze û dadger heqdestê
distîne û zilamê mezin, xwesteka
xerab ya canê xwe, bi eşkeretî
dibêje; bi vî awayî dek û dolaban
çê dikin[1]! 4 Yê herî qencê wan,
mîna qirşika ye; yê herî rastê wan,
ji benda bi sitirî xerabtir e. Roja
notirvanên te, roja sehêtî kirina te
hatiye; ew ê niha şaş bibin! 5 Bi
cîran ve bawer nebin; bi hevalê
nêzîk ve ewle nebin; ji pîreka ku
di himbêza te de raketiye, perên
deriyê devê xwe biparêze! 6 Ji ber
ku law heqaretê li bav dike, keç li
dijî dê, bûk jî li dijî xwesû radibe;
neyarên mirov, zilamên mala wî
bi xwe ne!

*Rêya Xelasiyê*
L.Yêr 3,21-30

7 Lê belê ez ê li XUDAN binêrim,
li benda Xwedayê xelasiya xwe
bisekinim; dê Xwedayê min, min
bibihîze! 8 Ya neyarê min, ji ber
min kêfxweş nebe! Ger ez bike-
vim jî, ez ê rabim; ger ez di tariyê
de rûnim jî, dê XUDAN ji min re

1 Pêk tînin.

bibe ronahî. 9 Heta ku doza min
bibîne û di derheqê min de darazi-
yê bide, ez ê xwe bisipêrim hêrsa
XUDAN. Ji ber ku li hemberê wî
sûcê kirim; dê min derxîne rona-
hiyê û ez ê dadiya wî bibînim.
10 Û wê demê, dê neyarê min jî
bibîne û şermezarî bi wî bigire.
Ew neyarê min ku, ji min re di-
got: Ka Xwedayê te XUDAN li
ku derê ye? Ez ê xwesteka xwe di
ser wî de bibînim, ew ê niha, mîna
heriya kuçan bê cûtin. 11 Roja ku
dîwarên te bên ava kirin tê. Dê di
wê rojê de sînor dûr bibe. 12 Wê
rojê dê ji Asûrê û ji bajarên Misirê
û ji Misirê heta çem (Feratê) û ji
behrê heta behrê û ji çiya heta çiyê
bên cem te. 13 Lê belê welat, ji ber
yên ku di wê de rûdinin, ji rûbalê
bera karên wan dê wêran bibe.

*Dua û Sipasî*

14 Keriyê mêrasa xwe yî di
daristana nava Karmelê de tena
serê xwe dijîn, netewa xwe bi
çoyê xwe bajo; mîna di rojên berê
de, bila li Başan û Gîleadê biçêrin!
15 Mîna rojên ku, tu ji warê Mi-
sirê derketibû, ez ê tiştên ku wan
şaş bike nîşanî wan bidim! 16 Dê
netewe bibînin û ji hemûya zor-
destiya xwe bişermin; dê destên
xwe têxin devê xwe; dê guhên
wan kerr bibin. 17 Mîna maran dê
axê bialêsin, mîna xişokên erdê, ji
cîhê ku ketinê dê bi lerizîn werin;
dê bi tirs werin Xwedayê me XU-
DAN û ji ber te dê bitirsin.
18 Xwedayê wekî te, yê ku fesadi-
yan paqij dike û gunehê bermayi-
yên mêrasa xwe diborîne kî ye?
Heta bêdawîbûnê nikare bi hêrsa
xwe bigire, ji ber ku ji dilovani-
yê hez dike. 19 Dê dîsa heyfa te
bi me were, tuyê dîsa fesadiyên
me di bin lingan de bicû û hemû
sûcên wan bavêjî balûpalê beh-
ran! 20 Mîna di rojên berê de, te
sondê ji bapîrên me re xwariye,
tuyê dilsoziyê ji Aqûp re û dilova-
niyê ji Birahîm re bikî.

# NAHÛM

*Pêşgotin*

Nahûm, pirtûkek wusa ye ku ji berê ve ketina Neynowaya serbajarê Asûrê neyarê Îsraêl yê xwurt e, têdighîne. Di B.Z. sala 612'an de têkçûna Neynoawayê, mîna daraziya Xwedê ya li ser neteweyek xedar û bixirûr tête dîtin.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-15 | Daraziya Neynowayê |
| 2:1-3:19 | Ketina Neynowayê |

*Ji Neynowayê re hêrsa XUDAN*

1 Barê Neynowayê. Kitêba
xewn û xeyala Nahûmê
Elkoşî.
2 XUDAN, Xwedayek çavnebar
û tolê hildide yî; XUDAN tolê
hildide û bi xezebê ve tijî ye;
XUDAN ji neyarên xwe tolê hil-
dide û li dijî neyarên xwe hêrsa
wî domdar e. 3 XUDAN dereng
dikeribe û di quwetê de mezin e û
yê bisûc tu carî bêsûc dernaxîne;
rêya XUDAN di bahoz û bagerê
de ye û ewr toza lingên wî ne.
4 Bi behrê ve dipeke û wê ziwa
dike û avên hemû çeman ziwa
dike, Başan û Karmel diçilmi-
sin, çîçega Lubnanê jî diçilmise.
5 Ji wî çiya dilerizin û gir duhu-
lin û li ber wî rûyê erdê û dinya û
hemûyên ku tê de rûdinin ji cihê
xwe ve dihejin. 6 Ma kî dikare
li ber xezeba wî bisekine? Û kî
dikare li ber hêrsa xezeba wî bi-
sekine? Hêrsa wî mîna agir diri-
je û bi destê wî zinar diperçiqin.
7 XUDAN qenc e, di roja ten-
gasiyê de birc e û bi zilamên ku
penaberî xwe bûyîne dizane. 8 Lê
belê dê cihê wî bi lehiya rabûye
bitûmî xopan bike û dê neyarên
xwe bajo tariyê.
9 Ma hûn li dijî XUDAN pêşniyara
çi dikin? Dê ew ê bitûmî bitûmî bi-
qedîne; dê cara duwemîn tengasî
raneperî. 10 Ji ber çawa ku mîna
keleman ve bi hev re girêdayî bin
û wekî ku bi araqan serxweş bin,
mîna kayê ziwa bitûmî bitûmî
şewitîn. 11 Zilamê ku li dijî
XUDAN ramanê xerabiyê dike,
şîretkarê bi kêr nayê, ji te derket.

12 XUDAN wusa dibêje: Ger ew,
di quwetê de tam û di hejmarê de
zêde bibin jî, dê dîsa bêne jêkirin,
dê ew ê jî derbas bibe û here. Ger
te nizm kiribim jî, ez ê carek din
te nizm nekim. 13 Û niha ez ê ji
ser te nîrê wê bişikînim û ez ê
qeydên te biqetînim.
14 Û êdî bona ku bila ji navê te
nijad nebe, XUDAN bona te emir
da: Ez ê ji mala îlahên te pûtê qe-
wartî û pûtê rijandî jêkim û ba-
vêjim; ez ê tirba[1] te çêbikim; ji ber
ku tu sernewq î[2]!
15 A vay, lingên yê ku mizgîni-
yê tîne û xweşiyê dide bihîstin li
ser çiyayan e! Ya Cihûda, cejnên
xwe pîroz bike, qewlên xwe bide!
Ji ber ku dê carekî din ji hundirê
te zilamê bêkêr derbas nebe; ew
bitûmî hatiye jêkirin û avêtin!

*Ketina Neynowayê*

2 Yê ku dişkîne û diperçiqîne
derket hemberî te, bircê bi-
parêze, li benda rê be, pişta xwe
xwurt bike, quweta xwe zehf
bizeximîne! 2 Ji ber ku XUDAN
tiştê ku Aqûp pesna wê dida, mîna
tiştê ku Îsraêl pesnê wê dida tîne
rewşa wê yî berê; ji ber ku dizan
wan şelandin û dalitên wanî mêwê
xera kirin. 3 Mertala egîdan hate
sor kirin, egîdên dijwar soran
li xwe kirin; di roja wî yî amade-
kariyê de erebeyên wî yên cengê
bi şewla polayê dibiriqin û rim
kil dibin. 4 Erebeyên cengê mîna
dînan di kuçan de baz didin; di
qadan de bi vir û wir ve di êrîşê
de ne; xuyabûna wan mîna pêtalê;
mîna birûskan di teqizînê de ne.
5 Zilamên xwe yê mezin di bîra
xwe de tînin; ew di meşa xwe de
tilpekî dibin; bi dîwarê wê ve di-
teqizin û meterîs tête amade kirin.
6 Deriyên çeman hatin vekirin û
qesir huliya û têk çû. 7 Yê ku dê
bibe bû û wî tazî kirin û birin û
cariyên wî di lêxistina sînga xwe
de dinalin, wekî dengê kevokan.
8 Û ji rojên berê ve Neynowa
mîna burka avan bû; lê belê ew di
revê de ne! Bi gotina: Bisekinin,
bisekinin! bang dikin; lê belê
kesî ku wecê xwe bizivirîne nîne.
9 Zîvê talan bikin, zêr talan bikin!
Ji ber ku dawî ji malên kom bi
komê û ji dewlemendiya her
tewrî pertalên[3] bi qîmet re nîne.
10 Vala yî, tena yî, wêrane yî! Û
dil dihule û çong li hev dikevin û
di hemû piştan de êş hene û wecê
giştikan çilmisîne. 11 Qula şêran
û cîhê ku şêrên ciwan nêçîra xwe
lê dixwin, ma li ku derê ne? Li wê
derê ku şêr û mêya wî û çêlika şêr
lê digeriyan û kesî ku wan bitirsî-

[1] Gor, an jî: Qebr.
[2] Rezîl, an jî: Sivik hatî dîtin.
[3] Yanê alavên.

ne tune bûn. 12 Şêr qasî ku têra
çêlikên xwe dikir diperçiqand û
bona şêra xwe yî mê dixeniqand
û şikeftên xwe bi nêçîrê û qulên
xwe bi qurbanan ve dadigirtin.
13 A vay, ez li dijî te me; gotina
XUDANê artêşan û ez ê erebeyên
wî yên cengê di hundirê duh de
bişewitînim û dê şûr, şêrên te yî
ciwan bixwin û biqedînin û ez ê
nêçîra te ji rûyê erdê ve jêkim û
bavêjim û êdî dengê şandiyên te
dê neyên bihîstin!

3 Wey li serê bajarê bi xwîn!
Gişt bi derew û şelandinê
ve tijî; talankarî ji holê ranabe!
2 Dawiya dengê qamçî û dengê te-
qûreqa tekeran û hespên baz didin
û erebeyên cengê yên ku diteqizin,
3 siwarên ku hol dibin û şurê ku
lêdidin û rima ku dibiriqe û hen-
ga yên ku hatine lêxistin û komela
mezin ya miriyan û dawiya laşan
nîne; gava mirov dimeşe, ling bi
laşan ve dileqitî; – 4 ji ber zêde-
yiya fahşetiyên fahîşa dilnîwaz,
xwediyê sêhran e, bi fahşetiyên
xwe neteweyan û bi sêhrên xwe ve
eşîran difiroşe. 5 A vay, ez li dijî
te me! gotina XUDANê artêşan û
ez ê dawên te rakim wecê te û ez
ê tazîbûnên te nîşanî neteweyan
û şerma te nîşanî welatan bidim!
6 Û ez ê pîsitiyan bavêjim ser te
û ez ê te risway bikim û ez ê te
pêşkêşî temaşeyê bikim. 7 Û dê
wusa bibe ku, hemûyên ku li te di-
nihêrin, dê ji te birevin û dê bibêjin:
Neynowa wêran bû! Ma bona wê
dê kî li xwe bixe? Ma ez ji ku bona
te li xemrevînkiran bigerim?
8 Ma tu ji No-Amon hîn jî qenc-
tir î? Ew bajarê ku, di nav çeman
de bû, li dora wê av hebûn; birca
wê di behrê[1] de bû û dîwarê wê ji
behrê bû. 9 Welatê Hebeşê û Mi-
sirê quweta wê bûn û bêdawî bû;
Pût û Lûbiyan alîkarên wê bûn.
10 Çawa ku wusa bû dîsa jî hate
ajotin û çû sirgûniyê; çêlikên wê
jî li serê hemû kuçeyan bi erdê ve
hatin lêxistin û bona zilamên wê
yî bigiramî pişkê avêtin û hemû
mezinên wê li zincîran ve hatin
lêxistin. 11 Tuyê jî serxweş bibe;
tuyê xwe veşêre; li ber neyar tuyê
jî li bircekî sitariyê ve bigere!
12 Hemû bircên te tevî nûberên
xwe yî pêşîn mîna darên hêjîrê
ne; dema bên weşandin, dê bike-
vin devê yê ku dixwe. 13 A vay,
di hundirê te de neteweya te bûn
pîrek! Deriyên welatê te ji neyarên
te re fireh vebûn û agir çilmêre-
yên deriyên te xwarin û qedandin!
14 Bona dema dor û ber lê girtinê
ji xwe re avê bikişîne; bircên xwe
bizexmîne! Bikeve heriyê û kîlê
bicû; qalibê xistê amade bike[2]!

[1] Çemê Nîlê.

[2] An jî: Tifika xistê (tuxle) bizexmîne!

15 Dê agir li wir te bixwe û biqe-
dîne; dê şûr te jêbike û bavêje; dê
mîna yêlekê[1] te bixwe; mîna yêlekê
zêde bibe, mîna kullî zêde bibe!
16 Te bazirganên xwe ji sitêrkên
ezmanan zêdetir pirr kir; yêlek
belav dibe, dawiyê direve û diçe.
17 Mîrên te mîna kulliyan û serokên
te mîna refê kulliyan in; ew refê ku
di hênikiya rojê de li ser dîwaran
dadikevin, dema roj hiltê direvin
û cîhên wan nayê zanîn, li ku derê
ne. 18 Ya qiralê Asûrê, şivanên te
radikevin; maqûlên te xwe tev na-
din; li ser çiyayan netewa te belav
bû û kesî ku bide hev nîne! 19 Ji
şikestina te re derman nîne; birîna
te ya mirinê ye! Hemûyên ku aga-
hiyên te bihîstine, bona te çepikan
lê dixin[2]; ji ber xerabiya te ya ku
dawiya wê nehate birrîn, ma ji ser
kî re derbas nebû ku?

[1] Navê kulliya berî bête halê ku bifire ye.

[2] Dest li hev dixin, an jî: Destên xwe di hev dan.

# HABAQÛQ

*Pêşgotin*

Peyxamber Habaqûq B.Z. ber ve dawiya sedsalên 7'an di dema ku Babîloniyan li Rojhilata navîn serweriyê dajotin de jiya. Habaqûqê ji zordestiya van mirovên xedar, diket bêaramiyek kûr, bi vî awayî ji Xudan pirsiya: "Dema yên rast dibe xwarina xeraban, ma çima tu bêdeng î?" (1:13). Xudan got ku dê wextê li cîh bikeve tevgerê. Wekî din: "Dê yê salih, bi baweriya xwe bijî" got (2:4).

Wekî din pirtûk dawiya tirsehêz ya ku dê were serê xeraban têdighîne. Pirtûk bi qesîdeyek baweriya Habaqûq ya xwurt tîne ziman û mezinahiya Xwedê pîroz dike ve, dawî dibe.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:4 | Gazincên Habaqûq û bersiva Xudan |
| 2:5-20 | Dawiya tirsehêz ya xeraban |
| 3:1-19 | Duaya Habaqûq |

*Ji XUDAN re gazincên Habaqûq*

1 Barê ku peyxamber Habaqûq dîtiye.
2 Ya XUDAN, heta çi wextî ez
ê bangî hawarê bikim ku, tuyê
nebihîzî? Ez bi gotina zorbaziyê
fîxanê ji te re dikim û tu xelas
nakî! 3 Çima tu fesadiyê nîşanî
min didî? Û tu jî li rêşaşiyê dinihêrî?
Ji ber ku dizî û zorbazî li
hember min e; û şer dibe û koşîn
derdikevin. 4 Ji bo vê yekê hêza
zagonê namîne û rastî dernayê
qadê. Ji ber ku mirovê xerab, dora
yê salih digire; bo vê yekê darazî
bi çewtî derdikeve[1]!

*Bersiva XUDAN*

Yêr 5,15-17

5 Li nava gelan binihêrin û bibînin;
ji ber di rojê we de ez karek
dikim ku ji we re bê gotin jî, hûn
qet bawer nakin! 6 Ji ber ku a vay,
ez, bona warnişînên ne yê xwe ye
ji xwe re bikin milk, ew netewa
tund û êrişker, Kildaniyan, ên ku

1 An jî: Dadî tê çepandin.

di firehiyên gerdunê de digerin,
radikim ser pêlan. 7 Ew bi erjeng
û tirsehêz in û maf[1] û birêziya
wan, ji wan e. 8 Û hespê wî jî ji
pilingan bi hêz û ji gurên şeviyê
hartir in. Û siwarê wî belav dibin
û siwarê wî ji dûr ve tên. Mîna
teyra ku xwe davêje ser xwarinê,
difirin. 9 Hemû bona zorbaziyê
tên. Berê wecê wan li pêşiyê ye.
Û mîna axê hêsîran berhev dikin.
10 Û ew bi qiralan ve şa dibe û
mîr jî ji bo wî tiştên pêkenok in.
Ew bi her kelehê ve dikene; ji ber
ku axê dajo û wan bi dest dixe.
11 Ew dem, mîna bayê zû derbas
bibe û biçe û ew ê bisûc be; ji ber
ku ev hêza wî îlahê wî ye!

*Habaqûq dîsa ji XUDAN re gazincan dike*

12 Ya XUDAN, Xwedayê min,
pîrozkirê min, ma tu ne ji bêpêşiyê
ye? Em namirin. Ya XUDAN, te
bona wê hukm danî û tu; ya Zinar,
te wê perwerde û zexm kir. 13 Ya
tu; yê ji dîtina xerabiyê çavên wî
paqij û li çewtiyan nanihêre; ma
çima tu li yên ku xayîntiyê dikin
dinihêrî û gava mirovê xerab, yê
ku ji xwe hîn jî salihtir e dadiqur-
tîne, dengê te dibirî[2]?
14 Û çima tu mirovan mîna masi-
yên bê rêvabir û mîna xîşokan dikî?
15 Ew vana hemûyan bi şewka
xwe derdixe, bi tora xwe digire û
bi tora reşandî ve wan berhev dike.
Bo vê yekê kêfxweş û dilşa dibe.
16 Bo vê yekê, qurbanê ji tora xwe
re jê dike û ji tora xwe yî reşandî
re buxurê vêdixe. Ji ber ku bi wan,
para wî xurt e û xwarina wî zêde
ye. 17 Ji bo vêya ma tu carî tora
xwe vala dike? Û bi bêînsafî dê her
tim gelan bikuje?

*Bersiva XUDAN û dê yê salih bi baweriya xwe bijî*

Îbr 10,35-39; Mîk 7,7-10

2 Ezê li cîhê goyînê û li ser
barûyê bisekinim. Û ez ê bi-
bêjim hela ew ê bi min re çi bi-
peyive û bona gazincên min ew
ê çi bersivê bide, bona vana ez ê
li bendê bisekinim. 2 Û XUDAN
bersiv da min û got: Xewna xwe
binivîse û wan li ser lewhan baş
bineqşîne ku yê bixwînin, bila
rast bixwînin! 3 Ji ber ku xewn,
bona demek tê zane ye. Û bona
dawî hatinê lez dike û ew ê nerast
dernekeve. Ger dereng bikeve, li
benda wê be; ji ber ku ew ê mu-
heqeq bê. Ew dereng namîne.
4 A vay, di hundirê wî de canê
wî ne rast e, pesnok e; lê belê dê
yê salih, bi baweriya xwe bijî. 5
Û xemr[3] jî xaîn e, mirovek qurre

[1] Hukm, dadmendî.
[2] Dengê te dernakevî?
[3] Şerab.

ye, li welatê xwe nasekine; ew
mirovê ku xwestinên xwe mîna
warên miriyan fireh dike û mîna
mirinê ye û têr nabe. Û hemû ge-
lan li cem xwe dicivîne û hemû
qewman li cem xwe disekinîne.
6 Ma vana hemû, dê li dijî wî met-
helok û bêçêbûnên dizî nebêjin?
Û ew ê nebêjin: Wey li halê wî,
yê ku malê ne yê xwe ye zêde
dike! Hîn heta çi wextî? Û yê bi
mişkane[1] girtinê ve giraniyê dide
xwe[2]! 7 Ma yê ku dev li te kin,
ew ê nişka ve ranebin? Û yê te
bilerzînin ew ê hişyar nebin? Û
tuyê ji wan re bibî malê talanê.
8 Ji ber ku te pirr gel tazî kir û
bona xwîna mirovan û li welêt, li
bajêr û bona zorbaziya te yî li ser
gelê ku li van dera dijîn, hemûyên
ku ji ber qewman mayîne jî dê te
tazî bikin!
9 Wey li halê wî zilamî ku, bona
mala xwe ji xerabiyê xelas bike,
bibe derekî bilind, qezenca neheq
dixe mala xwe! 10 Bi qetîl kirina
pirr qewman te şermiyê xist xani-
yê xwe û sûc kirina te li hemberî
canê te ye. 11 Ji ber ku dê kevirê
dîwêr biqêre û beştê xanî jî bersi-
vê bide wî.
12 Wey li halê mirovê ku ji
xwînê bajaran sazûman kiriye û
bi neheqiyê ve bajaran ava kiri-
ye! 13 A vay, ma bona agir keda
kişandina gelan û bona ne tiştekî
westandina neteweyan, ne ji XU-
DANê artêşan e? 14 Ji ber ku av
deryayê çawa dadigre, dê gerdûn
jî ûsa bi mezintî û zaniyariya XU-
DAN ve tijî bibe.
15 Wey li halê mirovê ku araqê
dide cîranê xwe! Wey li te, tu
bona tazîbûna wan binihêre jahra
xwe didî wan! 16 Tu bi şermiyê
têr bû, ne bi mezintiyê; tu jî
vexwe û bê sunetbûna xwe şanî
bike; ew ê gopalê XUDAN ya di
destê wî yî rastê de, bigere û bi-
gihêje te. Û dê xerabî jî bê li ser
mezinahiya te. 17 Ji ber xwîna
mirovan û ji ber zorbaziya ku li
welat, li bajêr û li hemûyên ku li
wir dijîn hatiye kirin, zorbaziya
ku ji Lubnanê re hatiye kirin û
rûxandina ku heywana bi tirsê ve
dixe, dê te bixumîne!
18 Senema ku hunermend bi xe-
ritandinê çêdike, an jî bi hulan-
dinê çêdike; fêrmendê derewan
ji çi re dibe ku, hunermendê kar
dikin, wan senemê bê ziman çê-
dikin, dawiyê çawa bi wan bawer
dibin? 19 Wey li serê wî mirovê
ku ji êzingê re dibêje: Hişyar be!
Û ji kevirê bê ziman re dibêje:
Rabe! Ma ew dikare tu tiştî fêrî te
bike? A vay, bi zêr û zîv hatiye
rûkêşkirin û di hundirê wê de qet
hilmek nîne. 20 Lê belê XUDAN,

1 Rehîn.

2 An jî: Xwe dewlemend dike.

di perestgeha xwe yî pîroz de ye;
bila hemû gerdûn li hembera wî
bêdeng bin!

*Duaya Habaqûq*

3 Duaya peyxamber Habaqûq,
li gor Şîgyonotê.
2 Ya XUDAN, xebera te bihîstim
û tirsiyam; ya XUDAN, di navbe-
ra salan de karê xwe bivejîne; di
navbera salan de wê bighîne; di
nava hêrsê de dilovaniyê di bîra
xwe de bîne!
3 Xwedê ji Temanê û Pîrozker ji
çiyayê Paranê hat. (Sela.)
Mezintiya wî ezmanan nixu-
mand û dinya bi pesnahiya wî ve
tijî bû.
4 Û biriqandina wî weke rona-
hiya rojê bû; ji destê wî tîrêjê
ronahiyê derdiketin û veşartina
hêza wî li wir e. 5 Weba di
pêşiya wî de dimeşiya û li pêy
lingê wî jî nexweşiya giran der-
diket.
6 Ew sekinî û gerdûnê pîva,
nihêrt û gelan lerizand û çiyayên
qedîm parî parî bûn. Girên bê-
dawî serî xwar kirin. 7 Min
konên Kûşanê di tengasiyê de
dît, dawên kona diyarê Midyanê
lerizîn. 8 Ma XUDAN ji çeman
ve xeyidî? Hêrs û xeyda te li
hemberî çeman e? An jî xezeba
te li hemberê behran e ku tu li
hespên xwe, li erebeyên xelaski-
rinê siwar bûyî?
9 Te kevana xwe bitûmî, bitûmî
derxist; qewlika xwe bi tîran ve
tijî kir! (Sela.)
Te rûyê erdê bi çeman ve
qelişand.
10 Dema çiya te dîtin, bi jan le-
rizîn; lesar herikîn çûn, balûpal
deng da û destên xwe ber bi jor
ve rakir.
11 Ji nûra tîrên te yî difirin, ji tîrê-
ja biriqandina rimê te, roj û heyv
li cîhê xwe sekinîn.
12 Te rûyê erdê bi xezebê geri-
ya, gelan bi hêrsek mezin cût û
şikestand.
13 Bona qewmê te xelas bibe,
bona ku yê hatiye mesh kirin xe-
las bibe derket; ji mala yê xerab;
heta qamê te bingehê vekir û ser-
bana wî eciqand. (Sela.)
14 Te serê leşkerên wî bi rimên wî
qul kir, bona min belav bikin, mîna
bahozê hatibûn, kêfxweşbûna
wan, te digot qey weke yekî bin-
ketî daqurtînin.
15 Te behr û avên xurt, bi hespên
xwe ve cût.
16 Bihîstim û laşê min lerizî; ji
dengê te lêvên min liviyan. Pûçî
dikeve hestiyên min û li cîhê ku
disekinim dilerizim. Ji ber ku divê
ez bi aramî, li benda roja tengasi-
yê, derketina netewa ku dê nijdê li
me bike, bim.
17 Ji ber ku dara hêjîrê çîçek nede
û şitilan fêkî tune be jî û keda
zeytûnê bi erdê ve vala derkeve û

erd xwarinê nedin jî; ger hewşên
pez vala bibin û di axuran de ga
nemabin jî;
18 Lê ez ê dîsa bi XUDAN ve
kêfxweş bibim, bi Xwedayê xwe yî
xelasker ve bicoş û kêfxweş bibim.
19 XUDAN, Xudan hêza min e
û lingê min dike mîna lingê as-
kan û min li ser derên bilind ve
dimeşîne.
Bona serekê mûsîkê, bi haletên
minî sazî!

# TSÊFANYA

*Pêşgotin*

Peyxamber Tsêfanya B.Z. di nêviyê duwem ya sedsala 7'an de, bi dibetiyek mezin berî salên reformên olî yên qiral Yoşiya B.Z. di sala 621'ê de kiriye, bangî gelê Cihûdayê û yên ku li dora wê ne kir. Pirtûk van mijarên peyxamberiyê digire naveroka xwe: Dê roja bicezakirina Cihûdayê bi îlahê wekî din re diperiste were. Dê Xwedê neteweyên din jî biceza bike. Her çiqas Orşelîm dawiyek xerab bibîne jî, dê di nava demê de bajar bête selihandin, mirovên dilnizm û rast ên ku li wir dijîn jî dê bigihêjin aramiyê.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:3 | Roja daraziya Xudan |
| 2:4-15 | Aqûbeta tirsehêz ya cîranên Îsraêlê |
| 3:1-20 | Ceza û xelasiya Orşelîmê |

*Îkaza li dijî Bêtariyê*

1 Gotina XUDAN ya di rojên
Yoşiyayê lawê Amonê qiralê
Cihûdayê de, ji Tsêfanyayê lawê
Kûşiyê, lawê Gedalyayê, lawê
Amaryayê, lawê Hîzkiya re hatiye.
2 Ez ê ji rûyê erdê ve her tiştî rakim
û paqij bikim, gotina XUDAN.
3 Ez ê mirov û heywan bimaliştim;
ez ê civîkên ezmanan û masiyên
behrê û zilamên xerab û tilpeki-
yan bimaliştim û ez ê ji rûçikê erdê
mirov jêbikim û bavêjim, gotina
XUDAN. 4 Û ez ê destê xwe bi
ser Cihûdayê û bi ser hemûyên ku
li Orşelîmê rûdinin ve dirêj bikim
û ez ê yên ku ji ber Baal mane,
tevî kahînan navê kahînên pûtê
5 û li ser xaniyan yên ku ji artêşa
ezmanan re peristinê dikin; yên
ku bi XUDAN sondê dixwin, lê
belê li ser Malkan[1] jî sondê di-
xwin û peristinê dikin 6 û yên ku
ji pêy XUDAN şunda vedigerin û
yên ku li XUDAN negeriyane û
li wî nepirsîne, ji vî cîhî jêbikim
û bavêjim.
7 Li ber Xudan, XUDAN hiş bike!
Ji ber ku roja XUDAN nêzîk e;
ji ber ku XUDAN qurbanê ama-

[1] An jî: Qiralê wan.

de kir, yên ku bangî wan kirine
pîroz kirin. 8 Û dê di roja qurba-
na XUDAN de wusa bibe ku, ez
ê sehêtiyê li serokan û li lawên
qiral û li hemûyên ku kincên bi-
yan li xwe kirine bikim. 9 Û ez ê
wê rojê sehêtiyê li hemûyên ku
ji ser şêmûgê ve hol bûne bikim,
ewên ku, bi zordestiyê û bi fene-
kiyê mala efendiyê xwe dadigirin.
10 Û wê rojê dê ji deriyê masîva-
nan şemateya qêrînê û ji taxa du-
wemîn ûrîn û ji aliyê giran şikestina
mezin bibe, gotina XUDAN.
11 Biûrin, ya hûn, yên ku li Makteşê
rûdinin! Ji ber ku hemûya taximê
bazirganan[1] tune bûn; hemûyên ku
bi barê zîv in hatin jêkirin û avêtin.
12 Û di wê wextê de dê wusa bibe
ku, ez ê bi qendîlan li Orşelîmê bi-
gerim. Û ez ê sehêtiyê li zilamên ku
li ser tilpên xwe hişk bûyîne bikim,
ewên ku, di dilên xwe de: XUDAN
qenciyê jî nake, xerabiyê jî nake,
dibêjin. 13 Û dê malên wan talan
û xaniyên wan wêran bibin û dê
xaniyan ava bikin, lê belê dê di
hundirê wan de rûnenin û dê rezan
deynin, lê belê xemra wê vene-
xwin.

*Roja XUDAN ya mezin*

Hêz 7; Yow 2,1-11

14 Roja mezin ya XUDAN nêz e,
nêz e û zehf bilezî tê, dengê roja
XUDAN! Egîd li wir bi jan diqê-
re. 15 Ew roj roja xezebê ye, roja
tengasî û zehmetê, roja xopanî û
wêranetiyê, roja reş û tariyê, roja
ewr û reşetariyê, 16 roja li dijî ba-
jarên bi dîwar, li dijî qûleyên qo-
zîk yên bilind, roja borî û qêrînê
ye. 17 Û ez ê tengasiyê bi ser mi-
rovan ve bînim û dê mîna koran
bimeşin, ji ber ku li dijî XUDAN
sûcê kirin û dê xwîna wan mîna
tozê û goştên wan mîna zibilê
biweşin. 18 Dê di roja XUDAN
ya xezebê de, zêrên wan jî zîvên
wan jî nikaribin wan xelas bikin;
tenê agirê xîreta wî dê hemûya
welêt bixwe û biqedîne; ji ber ku
dê hemûyên ku li welêt rûdinin
bigehînin dawiyê, him jî dawi-
yekî tirsehêz.

*XUDAN Neteweyan biceza dike*

2 Werin ba hev û bicivin ya gelê
bêfedî! 2 Û berî ku ferman
derkeve, berî ku roj mîna hûrikê
kayê derbas bibe û here, berî ku
hêrsa XUDAN ya sor bi ser we
ve were, berî ku roja XUDAN
ya hêrsê bi ser we ve were, bici-
vin! 3 Hemû dilnizmên dinê, yên
ku daraziyên XUDAN kirine, li
XUDAN bigerin; li rastiyê bige-
rin û li dilnizmiyê bigerin; di roja
XUDAN ya hêrsê de, dibe ku hûn
bên nuxumandin.
4 Ji ber ku dê dev ji Gazayê berdin
û birevin û dê Aşkelon wêran

1 An jî: Netewa Kenanê.

bibe; lê Aşdod jî, dê dema nîvro-
jê bête qewirandin û dê Ekron ji
rehên xwe ve bête rakirin. 5 Wey
li serê yên ku li qeraxa behrê
rûdinin, wey li serê gelê Kereti-
yan! Ya Kenan, warê Filistiyan,
gotina XUDAN li dijî we ye! Ez
ê te tune bikim, wusa ku, êdî dê
tu kesê ku di te de rûnê tune be.
6 Û şikeftên şivanan û hewşên
keriyan û qeraxa behrê dê bibin
çêregeh. 7 Û hemûya qeraxa avê
dê ji yên ku ji ber mala Cihûdayê
mayîne re be; dê ew ê li ser wan
keriyên xwe biçêrînin û êvarî dê
di xaniyên Aşkelonê de razên; ji
ber ku Xwedayê wan XUDAN dê
li wan bigere û dê sirgûnên wan
şunda bîne.
8 Min heqareta ku Moabê ne-
tewa min biçûk xistiye û li dijî
sînorên wan xwe mezintir kiriye
û gazincên lawên Ammon bihîst.
9 Ji ber vê yekê gotina XUDANê
artêşan, Xwedayê Îsraêlê, bona
mafê hebûna min, rastî dê Moab
bibe mîna Sodomê û lawên Am-
mon bibin mîna Gomorayê;
milkê gezokan û kortalên xwê û
wêranxaneyekî abadîn; dê ma-
weya netewa min wan talan bike
û dê maweya netewa min wan bi
mêrasî bistîne. 10 Dê ev ê bibe
berdêla quretiya wan, ji ber ku
biçûk xistin û li dijî neteweya
XUDANê artêşan xwe mezintir
kirin. 11 Dê XUDAN li dijî wan
tirsehêz be; ji ber ku dê hemû
îlahên dinê birçî bihêlin; ji ber ku
mirovan, her kes ji cîhê xwe ve,
dê hemû giraveyên neteweyan bi
wî ve biperistin.
12 Ya Hebeşiyan, hûn ê jî bi şûrê
min ve bêne kuştin. 13 Û dê destê
xwe berbi bakur dirêj bike û dê
Asûrê tune bike û dê Neynowê
bike wêranxaneyek û mîna çolê
ziwa bike. 14 Û keriyan, hemû
heywanên neteweyan, dê di hun-
dirê wê de mexel werin[1]; him
zengilok him jî jûjî dê di serê
sitûnên wê de şevê biborînin; dê
di şivakeyan de dengên wan bête
xwendin; dê xopanî di şêmûgan
de bin; ji ber ku tamdayiyên darê
erzê jê hatin rakirin. 15 Bajarê ku
şahiyê dike, di ewlekariyê de rû-
dinê û di dilê xwe de: Ez heme
û xeynî min tu kes nîne! dibêje
ev e; çawa bû wêraneyek û bona
cenawiran bû cîhekî raketinê!
Her zilamê ku ji cem wî ve der-
bas bibe, jê re difike û destê xwe
kil dike.

*Hatina Orşelîmê*

3 Wey li serê wî yê asê, wî yê
qirêj, wî bajarê xedar! 2 Go-
tinê guhdarî nekir; fêr nebû; bi
XUDAN ewle nebû; nêzîkî Xwe-
dayê xwe nebû. 3 Di hundirê wê
de serokên wê şêrên digurmin

[1] Mexel bibin, an jî: Rakevin.

in, serwerên wê gurên êvarê ne;
tiştekî ji sibehê re nahêlin. 4 Pey-
xamberên wan zilamên xayîn
û çivanok in; kahînên wan yê
pîroz xera kirin, zorê dan zagonê.
5 XUDANê dad di hundirê wê
de ye; neheqiyê nake; her sibeh
di derxistina dadiyê ku derdixî-
ne ronahiyê de şunda namîne;
lê belê zilamê neheq bi şermê
nizane. 6 Neteweyan jêkirim û
avêtim; qûleyên wanî qozîkê ki-
rim wêranxane; kuçeyên wan
xopan kirim, tu kes derbas nabe;
bajarên wan wêran bû, kesek
nema, kesê ku rûnê nîne. 7 Min
got: Ji min bitirse; fêr bibe! Û li
gor her tiştên ku min bona wan
qerar daye, dê şunwara wan neyê
jêkirin û avêtin; lê belê wan bi
lezî kirin û hemû karên xwe pûç
kirin.
8 Ji ber vê yekê heta roja ku ez
ê rabim nêçîrê li benda min bin,
gotina XUDAN; ji ber ku dara-
ziya min civandina neteweyan
e, da ku, bona ez xezeba xwe,
hemû hêrsa xwe yî sor bi ser
welatan ve birijînim ez wan bî-
nim cem hev; ji ber ku dê hemû
dinya bi agirê xîreta min ve bên
daqurtandin.
9 Ji ber ku wekî bi dilekî ji XU-
DAN re qûlitiyê bikin, bona
hemû bangî navê XUDAN bikin,
ez ê wê çaxê lêvên paqij bidim
neteweyan. 10 Yên ku ji wêde-
tira çemê welatê Hebeşê ji min
re diperistin, qîza yên min yên
ku hatine belav kirinê, dê wekî
pêşkêşiyê ji min re bînin. 11 Ji
ber hemû karên te yî guneh yên
ku te li dijî min kiriye, tuyê wê
rojê şerm nekî; ji ber ku ez ê wê
çaxê yên bi semyana te şahiyê
kirine, ji nav te rakim û êdî tuyê
li çiyayê minî pîroz carekî din
betran nebe. 12 Lê belê ez ê di
hundirê te de neteweyek dilnizm
û rûnerm berdim û ew ê xwe
bisipêrin navê XUDAN. 13 Dê
maweya Îsraêlê neheqiyê nekin û
derew nebêjin û di devê wan de
dê zimanê bi fen tune be; ji ber
ku dê ew ê biçêrin û rakevin û dê
kesî ku bitirsîne tune be.

*Qesîdeya Dilxweşiyê*

14 Ya qîza Siyonê, bistirê! Ya
Îsraêl biqêre! Bi hemûya dil
kêfxweş bibe û bicoşe, ya qîza
Orşelîmê! 15 XUDAN daraziyên
ku bona te ne rakir, neyarê te qe-
wirand; qiralê Îsraêlê, XUDAN
di hundirê te de; êdî tuyê ji xe-
rabiyê netirse! 16 Dê wê rojê ji
Orşelîmê re: Metirse, ya Siyon!
Bila destên te sist nebin! bête go-
tin. 17 Xwedayê te XUDAN, Xe-
laskerê xwurt, di hundirê te de ye;
dê bona te zehf şa bibe; dê di hun-
dirê hezkirina xwe de hiş bibe; dê
bona te bi sitrandinê bicoşe. 18
Ez ê bona cejnên eşkere yên ku bi

keser in bicivînim, ew ji te bûn,
barê ku li ser wî, bona wan bû
şermezarî. 19 A vay, wê gavê ez
ê bi hemûyên ku te nizm kirine re
mijûl bibim û ez ê yê kulek xelas
bikim û ez ê yê ku hatiye ajotin
bidim hev; ez ê wan bi rûmet û
bi nav û deng bikim; ewên ku,
şermezariya wan li hemûya dinê
bûn. 20 Wê çaxê ez ê we bînim û
wê gavê ez ê we bicivînim; ji ber
ku dema li ber çavên we sirgûnên
we şunda bînim, ez ê we di nav
hemû neteweyên dinê de bi nav û
deng û bi rûmet bikim, XUDAN
dibêje.

# HAGAY

*Pêşgotin*

Pirtûka Hagay, belavokên Xudan bi navdîtiya Peyxamber Hagay ve B.Z. di sala 520'an de şandiye digire naveroka xwe. Gelê Îsraêlê ji sirgûnê vegeriyabûn û li Orşelîmê bi cîh bûbûn û malên xwe ava kiribûn. Lê belê perestgeh hîn xerabûyî bû. Belavok bangî serok û pêşengên gel dikir ku bila dest pê bikin û perestgehê ji nû ve ava bikin. Xudan ji bona gelê nû û pîroz bûye, hatinek bi xweşî û aştiyê ve tijî wad dike.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-15 | Banga bona avakirina perestgehê |
| 2:1-23 | Belavokên xemrevînî û hêviyê |

1 Di du saliya qiral Daryûs
de, di meha şeşemîn de, di
roja yekem ya mehê de bi des-
tê peyxamber Hagay vê gotina
XUDAN, ji Zerûbbabelê lawê
Şealtiyêlê waliyê Cihûstanê û ji
Yeşûyê lawê Yehotsadakê kahînê
mezin re hat. 2 XUDANê artêşan
bi vî awayî diaxife û dibêje: Ev
netewa dibêje: Wext, bona ava
kirina mala XUDAN wext neha-
tiye! 3 Û bi destê peyxamber Ha-
gay vê gotina XUDAN hat: 4 Ma
dema ev xanî wusa xerab be, bona
we, li malên we yî rûgirtî wexta
rûniştinê ye? 5 Û niha XUDANê
artêşan wusa dibêje: Rêyê xwe
qenc bifikirin! 6 We zehf çandin,
lê belê hindikekî anîn malê; hûn
dixwin û têr nabin; vedixwin û
tîbûna we naşikê; li xwe dikin, lê
belê tu kesê ku germ bibe nîne; yê
ku mîşeyê distîne jî bona kîsikê
qûl mîşeyê distîne.
7 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Rêyên xwe qenc bifikirin!
8 Hilkişin çiyê, dar bînin û xanî
ava bikin; ez ê ji vêya razî bi-
bim û bêm bilindkirin, XUDAN
dibêje. 9 Hûn li benda gellekî
tiştan man û a vay, hindik bû û
dema we wê anîn malê, min bi
ser ve pif kirê. Ma ev ji çî ye?
Gotina XUDANê artêşan. Ji ber
mala min ya ku xopan disekine
yî; lê belê hûn, her kes baz didin
malên xwe! 10 Ji ber vê yekê ez-
man ji we xunavê diparêzin û erd

zadên xwe diparêzin. 11 Û min
bi ser welêt ve û bi ser çiyayan ve
û bi ser genim û bi ser xemra nû û
bi ser rûn û li ser tiştên ku ax wan
derdixînin û li ser mirov û li ser
heywên û li ser hemû keda dest
bangî ziwayiyê kir.
12 Û Zerûbbabelê lawê Şealtiyêl û
Yeşûyê lawê Yehotsadakê kahînê
mezin û hemû maweya netewê
gotina Xwedayê xwe XUDAN û
ji ber ku Xwedayê wan XUDAN
wî şandiye, li gotinên peyxamber
Hagay guhdarî kirin û netewe ji
ber XUDAN tirsiyan. 13 Û Ha-
gayê nûçevanê XUDAN, bi pey-
xambertiya XUDAN bi netewê
re axifî û got: Ez bi we re me,
gotina XUDAN. 14 Û XUDAN
ruhê Zerûbbabelê lawê Şealtiyêlê
waliyê Cihûstanê û ruhê Yeşûyê
lawê Yehotsadakê kahînê mezin
û ruhên hemû maweya netewê
hişyar kir 15 û di du saliya qiral
Daryûs de, di meha şeşemîn de,
di roja bîst û çarê mehê de hatin û
di mala Xwedayê xwe XUDANê
artêşan de xebitîn.

2 Di meha heftemîn de, di bîst
û yekê mehê de, bi destê pey-
xamber Hagay ve vê gotina XU-
DAN hat: 2 Niha bi Zerûbbabelê
lawê Şealtiyêlê waliyê Cihûstanê
û bi Yeşûyê lawê Yehotsadakê
kahînê mezin û bi hemû maweya
netewê re biaxife û ji wan re bi-
bêje: 3 Ma di nav we de ji yên ku
ji bermayiyên kesên ku vî xaniyî
di mezintiya wê yî din dîtine de
çend kes hene? Û niha ma hûn wê
çawa dibînin? Wekî di çavên we
de tunebûnek e, ma ne wusa ye?
4 Lê belê niha, ya Zerûbbabel,
xwurt bibe, gotina XUDAN û ya
Yeşûyê lawê Yehotsadakê kahînê
mezin, xwurt bibe, hemû netewa
welêt, hûn jî xwurt bibin, gotina
XUDAN û bixebitin! 5 Ji ber
ku gava hûn ji Misirê derketin û
dema Ruhê min di nav we de bû
li gor gotina ku bi we re birrîme,
ez bi we re me, gotina XUDANê
artêşan; metirsin! 6 Ji ber ku XU-
DANê artêşan wusa dibêje: Ca-
rekî din, wext kurt e û ez ê erd û
ezmanan û behr û reşahiyê bile-
rizînim 7 û dê hemû neteweyan
bilerizînim û hemûya tiştên birû-
met yên hemû neteweyan werin
û ez ê vî xaniyî bi mezinahiyê
ve dagirim, XUDANê artêşan
dibêje. 8 Zîv yê min, zêr jî yê
min, gotina XUDANê artêşan.
9 Dê mezintiya vî xaniyî ya
dawîn ji ya pêşîn mezintir bibe,
XUDANê artêşan dibêje û li vê
derê ez ê xweşiyê[1] bidim, gotina
XUDANê artêşan.
10 Di du saliya Daryûs de, di
meha nehemîn de, di bîst û çarê
mehê de, bi destê peyxamber

[1] Aştiyê, tendûrustiyê.

Hagay vê gotina XUDAN hat:
11 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Niha bi gotina: Her kesek di dawa
kincê xwe de goşt hilgire û bi
dawê xwe di nan de, di şorbê de,
xemr, rûn an jî di her yekî xwarinê
de bide, ma ew tişt pîroz dibe? ji
kahînan ve zagonê bipirse. 12 Û
kahînan bersivê dan û gotin: Na!
13 Û Hagay got: Kesekî ji ber be-
ratê mindar bûye, destê xwe ji van
tiştan yekî bixe, dê ew tişt mindar
bibe? Û kahînan bersivê dan û go-
tin: Mindar dibe! 14 Û Hagay ber-
sivê da û got: Ev netewa wusa ye
û li ber min ev gel wusa ye, gotina
XUDAN û her karên destên wan
wusa ne û tiştê ku li wir pêşkêş kiri-
ne mindar e! 15 Û niha rica dikim,
berî ku di Perestgeha XUDAN de
kevir deynin ser kevir, dema ku ji
îro û ji vê wêdetir e, qenc bifikirin!
16 Di wan deman de, dema zila-
mek digihaşt komikek bîst olçekî,
dibû komikek deh olçekî; dema
dihat ku ji teşta xemrê pêncî
qabî derxîne, dibû bîst qab xemr.
17 Min bi bayê sebûnê[1] û bi ufni-
kiyê û bi zîpikê li we û li her karên
destên we xist; lê belê hûn vene-
geriyan min, gotina XUDAN.
18 Ez rica dikim, baş bifikirin,
ji îroj, ji roja bîst û çarê meha
nehemîn ve ji roja ku bingeha
Perestgeha XUDAN avêtine ve
û dema ku ji vêya wêdetir e qenc
bifikirin! 19 Ma tov hîn di embarê
de ye? Belê, mêw û darê hêjîrê û
darê hinarê û darê zeytûnê berê[2]
nedan; ez ê ji îro ve bereketê bi-
dim we!
20 Û di roja bîst û çarê mehê de
cara duwemîn vê gotina XUDAN
ji Hagay re hat: 21 Bi waliyê
Cihûstanê Zerûbbabel re biaxife û
bibêje: Ez ê ezmanan û erdê bile-
rizînim 22 û ez ê textê qiraletiyan
bi ser û binî bikim û ez ê quwe-
ta welatên gelan xopan bikim û
ez ê erebeyên cengê û siwarên
wan bi ser û binî bikim û dê hesp
û siwarên wan bikevin, dê her
kes bi şûrê birayê xwe ve bike-
ve. 23 Ya qûlê min, Zerûbbabelê
lawê Şealtiyêl, gotina XUDANê
artêşan, ez ê wê rojê te rahêjim,
gotina XUDAN û ez ê te bikim
mîna gustîlka mohrê; ji ber ku
te hilbijartim, gotina XUDANê
artêşan.

1 Kerehû.
2 Fêkî, an jî: Mêw.

# ZEKERYA

*Pêşgotin*

Pirtûka Zekerya ji du beşên bingeh pêk tê:

1)Beşên 1-8, peyxambertiyên ku peyxamber Zekerya B.Z. di navbera salên 520-518'an de digire naveroka xwe. Gellekên van peyxambertiyan di awayê xewn û xeyalê de ne. Tîne ziman ku dê li Orşelîmê rêk û pêkî dîsa bê avakirin, perestgeh dîsa bête bîna kirin û dê gelê Xwedê bête pîroz kirin.
2)Beşên 9-14 di derheqê hatina Mesîhê ku gel bendewariyê wî ne û daraziya dawîn de dibeje.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-8:23 | Belavokên îkaz û hêviyê |
| 9:1-8 | Cîranên Îsraêlê têne biceza kirin |
| 9:9-14:21 | Xweşî û aştiya ku dê were |

*XUDAN, bona ku gel vegere wî bang dike*

2.Dîr 30,6-9

1 Di du saliya Daryûs de, di
meha heyştan de, vê gotina
XUDAN ji peyxamber Zeker-
yayê lawê Berekyayê, lawê Îddo
re hat: 2 XUDAN ji bapîrên we
zehf keribî. 3 Û ji wan re bibêje:
XUDANê artêşan wusa dibêje: Ji
min re vegerin, gotina XUDANê
artêşan, ez ê jî vegerim we, XU-
DANê artêşan dibêje. 4 Nebin
mîna bapîrên xwe! Peyxamberên
berê bangî wan kirin û ji wan re
gotin: XUDANê artêşan wusa
dibêje: Niha ji rêyên xwe yî xe-
rab û ji karên xwe yî xerab ve-
gerin! Lê belê wan nebihîstin û
min guhdarî nekirin, gotina XU-
DAN. 5 Bapîrên we, ka ew li ku
derê ne? Û peyxamberan, ma ew
abadîn dijîn? 6 Lê belê gotinên
min û zagonên min, yên ku min ji
qûlên xwe yî peyxamber re emir
kiriye, ma negîhaştin bapîrên we?
Û vegeriyan û gotin: XUDANê
artêşan li gor rêyên me û karên
me bi me çi kirinê fikirî be, bi me
re wusa kir.

*Xewn û xeyala yekem: Suwarî*

7 Di du saliya Daryûs de, di meha
yanzdehan bîst û çarê Şebatê[1] de
vê gotina XUDAN ji peyxamber
Zekeryayê lawê Berekyayê, lawê
Îddo re hat: 8 Şevê dîtim û a vay,
zilamekî ku li hespekî sor siwar
bûyî û di geliyê de, li nav darên
mûtikan de sekinîbû û li paş wî
hespên sor, şînboz û qemer he-
bûn. 9 Û gotim: Efendiyê min,
vana çi ne? Û milyaketê ku bi min
re diaxifî ji min re got: Vana çi ne,
ka ez nîşanî te bidim! 10 Û zi-
lamê ku di nav darên mûtikan de
sekinîbû, bersivê da û got: Vana
bona gerîna dinê yên ku XUDAN
şandine ne. 11 Û wana bersivê
dan milyaketê XUDAN, yê ku di
nav darên mûtikan de sekiniye û
gotin: Em di dinê de geriyan û a
vay, hemûya dinê di cihê xwe de
rûniştiye û di aramiyê de ye.
12 Û milyaketê XUDAN bersivê
da û got: Ya XUDANê artêşan,
ma tuyê heta çi wextî li vî bajarê
Orşelîmê û bajarên Cihûdayê re,
yên ku te heftê sal e xezebê li wan
kiriye, dilovaniyê neke? 13 Û
XUDAN ji milyaketê ku bi min re
diaxife re, bi gotinên qenc, bi go-
tinên ku xemrevîniyê didin ve ber-
sivê da. 14 Û milyaketê ku bi min
re diaxifî ji min re got: Bang bike
û bibêje: XUDANê artêşan wusa
dibêje: Ez bi xîretekî mezin, xîre-
ta Orşelîmê û Siyonê dikim. 15 Û
li dijî neteweyên bêxem bi hêrsekî
mezin dikeribim; ji ber ku, ez tenê
hinekî hêrs bûbûm, lê wan alîka-
riyê ji xerabiyê re kir! 16 Ji ber vê
yekê XUDAN wusa dibêje: Ez bi
dilovaniyan vegeriyam Orşelîmê;
dê xaniyê min li wê derê bête ava
kirin, gotina XUDANê artêşan û
dê tayê pîvanê bi ser Orşelîmê ve
bête kişandin. 17 Carekî din bang
bike û bibêje: XUDANê artêşan
wusa dibêje: Dê bajarên min dîsa
bi qenciyê ve tijî bibin û dê XU-
DAN dîsa xemrevîniyê li Siyonê
bike û dîsa Orşelîmê hilbijêre.

*Xewn û xeyala duwem: Çar qiloç û çar hesinkar*

18 Û çavên xwe rakirim û nihêr-
tim û a vay, çar qiloç. 19 Û ji
milyaketê ku bi min re diaxifî re
gotim: Ma vana çi ne? Û ji min
re got: Vana qiloçên ku Cihûdayê,
Îsraêlê û Orşelîmê belav kirine
ne. 20 Û XUDAN çar hesinkar
nîşanî min da. 21 Û gotim: Ma
vana bona kirina çi tên? Û axifî
û got: Qiloçên ku Cihûdayê belav
kirine ew in, wusa ku, qet tu kes
serê xwe ranekirin; vana jî, bona
wan bêzar bikin û qiloçên nete-
weyan li erdê bixin hatin, ew ne-
teweyên ku, bona warê Cihûdayê
belav bikin qiloçên xwe li dijî wê
rakirîbûn.

---
1 Sibatê.

*Xewn û xeyala sêwem: Tayê pîvanê*

2 Û çavên xwe rakirim û nihêr-
tim û a vay, zilamek û di destê
wî de tayê pîvanê hebû. 2 Û go-
tim: Tu diçî ku derê? Û ji min re
got: Ez diçim pîvana Orşelîmê, ka
firehiya wê çiqas e, dirêjiya wê
çiqas e bibînim diçim. 3 Û a vay,
milyaketê ku bi min re hevpey-
vînê dikir derket û milyaketekî din
bona pêrgîniya wî derket 4 û jê re
got: Bazde, bi wî xortî re biaxife
û bibêje: Ji ber zêdeyiya mirov û
heywanan, dê li Orşelîmê, mîna
gundên bêdîwar bête rûniştin.
5 Ji ber ku ez, gotina XUDAN, li
hawirdorê ez ê jê re bibim dîwarê
agir û di hundirê wê de wekî mezi-
nahî be ez ê bimînim.
6 Hê, hê! Ji welatê bakurê birevin,
gotina XUDAN; ji ber ku min we
mîna çar bayê ezmanan belav kir,
gotina XUDAN. 7 Hê, Siyon! Tu
ku, tevî qîza Babîlê rûdinê, bireve
û xelas bibe! 8 Ji ber ku XUDANê
artêşan wusa dibêje: Min ji nete-
weyên ku we talan kirine re li pêy
mezinahiyê şand; ji ber ku yê des-
tê xwe li we bixe wekî li bîbokên
çavên wî xistiye dibe! 9 Ji ber ku
a vay, ez ê destê xwe bi ser wan ve
kil bikim û dê ji yên ku ji wan re
qûlitiyê kirine re bibin malê talanê
û hûn ê bizanibin ku XUDANê
artêşan min şandiye. 10 Bistirê û
kêfxweş bibe, ya qîza Siyonê! Ji
ber ku a vay, ez têm û ez ê di hun-
dirê te de rûnim, gotina XUDAN.
11 Û wê rojê dê pirr neteweyan bi
XUDAN ve bêne girêdan û bibin
gelê min û ez ê di hundirê te de rû-
nim û tuyê bizanibe ku XUDANê
artêşan min ji te re şandiye. 12 Û
di axa pîroz de wekî para xwe,
dê XUDAN Cihûdayê bi mêrasî
rahêle û dê dîsa Orşelîmê hilbijêre.
13 Ya hemû mirovahî, li ber XU-
DAN hiş be! Ji ber ku ji şunwara
xwe yî pîroz hişyar bû û rabû!

*Xewn û xeyala çaremîn: Kahînê mezin Yêşû*

Îşa 44,22; 61,10

3 Û kahînê mezin Yeşûyê ku li
ber milyaketê XUDAN se-
kiniye û Îblîsê[1] ku bona bibe ne-
yarê wî li aliyê wî yî rastê seki-
niye nîşanî min da. 2 Û XUDAN
ji Îblîs re got: Bila XUDAN bi te
re bipeke, ya Îblîs! Belê, bila XU-
DANê ku Orşelîmê hilbijartiye
bi te re bipeke! Ma vî zilama ne
êzingê ku ji agir vekişiyayî û nîv
şewitî ye? 3 Û Yeşû kincê gemarî
li xwe kiribû û li ber milyaket se-
kinîbû. 4 Û milyaket bersivê da
û bi yên ku li ber wî sekinîne re
axifî û got: Ji ser wî kincê gemarî
jêbikin. Û jê re got: Binêre, ji ser
te fesadiya te rakirim û ez ê kincê
cejnê li te bikim. 5 Û gotim: Bila
şaşika paqij li serê wî bipêçin. Û

[1] Neyarê wî.

şaşika paqij li serê wî pêçandin û
kinc li wî kirin û milyaketê XU-
DAN li cem wî sekinîbû.
6 Û milyaketê XUDAN ji Yeşû re
şahdeyiyê kir û got: 7 XUDANê
artêşan wusa dibêje: Ger tu di
rêyên min de bimeşî û notirvani-
ya min bigirî, wê gavê tuyê ser-
weriyê li mala min jî bikî û tuyê
hewşên min biparêzî û ji nav wan
ên ku sekinîne, ez ê serbestiya
ketina hundir bidim te! 8 Niha,
kahînê mezin Yeşû, tu û hevalên
te yên ku di ber te de rûniştîne,
guhdarî bikin! Ji ber ku hûn zi-
lamên elametê ne! Ji ber ku, a
vay, ez ê qûlê xwe Zîl[1] derxînim
holê. 9 Ji ber ku, a vay, kevirê ku
danîme ber Yeşû, kevirê tekane
yê ku heft çav lê hene; a vay, ez
ê karê wê yî qewartinê bikim, go-
tina XUDANê artêşan û di rojekê
de ez ê fesadiya wî welatî ji holê
rakim! 10 Wê rojê dê ji we her
yek cîranê xwe bangî bin mêwa
tirî û darê hêjîrê bike, gotina XU-
DANê artêşan.

*Xewn û xeyala pêncemîn: Şimadank û darên Zeytûnê*

4 Û milyaketê ku bi min re
diaxifî dîsa hat û min, mîna
zilamekî ku ji xewa xwe ve hatiye
hişyar kirin, hişyar kir. 2 Û ji min
re got: Ma tu çi dibînî? Û gotim:
Dibînim û a vay, şimadankek[2],
gişt zêr û di serê wê de qaba wê
yî donê û li ser wê heft qendîlên
wê û ji heft qendîlên ku di ser wê
de ne re heft borî hene 3 û li cem
wê du heb darên zeytûnê, yek
li rastê qaba rûn û yek jî li çepê
wê. 4 Û bersivê dam û ji milya-
ketê ku bi min re diaxife re axi-
fîm û gotim: Efendiyê min, ma
vana çi ne? 5 Û milyaketê ku bi
min re diaxifî bersivê da û ji min
re got: Ma tu nizanî, vana çi ne?
Û gotim: Na, efendiyê min! 6 Û
bersivê da û bi min re axifî û got:
Gotina XUDAN ji Zerûbbabel re
ev e: Ne bi qudretê, ne bi quwetê,
lê bi Ruhê min, XUDANê artêşan
dibêje. 7 Ma tu kî ye, ya çiyayê
mezin? Tuyê li ber Zerûbbabel
bibe deştek! Di nav qêrînên: Qen-
cî[3], bila jê re qencî bibe de! Dê ew
ê kevirê xanî yê dawîn derxîne.
8 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 9 Destên Zerûbbabel bingeha
vî xaniyî avêtin û destên wî jî dê
wê temam bike[4] û tuyê bizanibe
ku XUDANê artêşan min ji we re
şandiye. 10 Ji ber ku ma kî roja
karên biçûk kêm dibîne? Ji ber ku
dê qincê[5] di destê Zerûbbabel de

---

1 Aj, şiv, an jî: Filîz.
2 Şamdank, mûmdank.
3 Xêr, lutif, kerem, an jî: Say.
4 Bi ser bikeve, an jî: Biqedîne.
5 Şaqûl.

ıibînin û van heftikan kêfxweş
ıibin; ew çavên XUDAN in; ew
avên ku, li hemûya rûyê erdê ve
ligerin!
1 Bersivê dam milyaket û jê re
gotim: Ma ev her du darên zey-
ûnê, yên ku li aliyê rast û çepê
imadankê ne, çi ne? 12 Û dîsa
ersivê dam wî û gotim: Ma ew
ıer du guliyên zeytûnê ên ku li
em her du mezrîpên zêrînî ne û ji
we mîna zêr rûnê diherikînin, çi
ıe? 13 Û bi min re axifî û got: Ma
u nizanî, vana çi ne? Û gotim:
Na, efendiyê min! 14 Û got: Vana
her du lawên zeytûnê ne, yên li
em XUDANê hemûya dinê di-
sekinin.

*Xewn û xeyala şeşemîn: Balorê ku difire*

5 Û dîsa çavên xwe rakirim û
nihêrtim û a vay, balorekî ku
difire dîtim. 2 Û ji min re got: Ma
u çi dibîn î? Û gotim: Ez balorekî
ku difire dibînim; dirêjiya wê bîst
gez[1] û firehiya wê deh gez. 3 Û
milyaket ji min re got: Naleta ku
dê li ser hemûya welêt bibare, ev
e; ji ber ku li gor tiştên ku li ali-
yekî balorê hatine nivîsandin, her
kesê ku diziyê dike dê bên jêkirin
û avêtin; li gor yên ku li aliyê wê
yî din hatine nivîsandin jî yên ku
bi derewan sondê bidin dê werin
qewirandin. 4 Ez ê wê derxînim,
gotina XUDANê artêşan û dê
bikeve mala diz û mala yê ku
bi navê min ve bi derewan sond
didin û dê di hundirê mala wî
de bisekine û dê tevî oniyên wê
û kevirên wê xanî bixwe û biqe-
dîne!

*Xewn û xeyala heftemîn: Pîreka di Efayê de*

5 Û milyaketê ku bi min re diaxifî
derket û ji min re got: Niha çavên
xwe bilind bike û ka ev tiştê ku
derdikeve çî ye, bibîne. 6 Û go-
tim: Ma ev çî ye? Û wî got: Vêya
efaya ku derdikeve ye. Û wî got:
Di hemûya welêt de xuyabûna
wan ev e. 7 Û a vay, devikê gule
hate rakirin û li wir, di hundirê
efayê de pîrekek rûniştîbû. 8 Û
wî got: Ev Xerabî ye; pîrekê berbi
jêr di hundirê efayê de tehn da û
wezina gule avêt hundirê efayê.
9 Û çavên xwe rakirim û nihêrtim
û a vay, du pîrek derketin û ba di
bazikên wan de bûn û mîna bazi-
kên leglegan bazikên wan hebûn
û efayê ji nav erd û ezman raki-
rin. 10 Û ji milyaketê ku bi min
re diaxifî re gotim: Ma vana efa-
yê dibin ku derê? 11 Û ji min re
got: Bona ji wê pîrekê re li warê
Şînarê xanî ava bikin, wê dibin û
dema ew xanî bête amade kirin,
dê pîrek li wir, li cihê xwe ve bête
danîn.

[1] Li rasteka menan binêrin.

*Xewn û xeyala heyştemîn: Çar*
*Erebeyên Cengê*

6 Û dîsa çavên xwe rakirim û
nihêrtim û a vay, ji nav du çi-
yayî çar erebeyên cengê derdike-
tin û çiya, çiyayên ku ji tûncê bûn.
2 Di erebeya yekem de hespên sor
hebûn û di erebeya duwem de hes-
pên qemer hebûn 3 û di erebeya
sêwemîn de hespên gewr hebûn
û di erebeya çaremîn de hespên
gewrê hesinî yên xwurt hebûn.
4 Û bersivê dam û ji milyaketê ku
bi min re axifiye re gotim: Efen-
diyê min, ma vana çi ne? 5 Û mil-
yaket bersivê da û ji min re got:
Vana çar bayên ku ji cihê hemûya
dinê li ber Xudan sekinîne der-
ketî ne. 6 Erebeya ku hespên wê
qemer in berbi warê bakur ve
derdikeve û hespên gewr li pêy
wan derketin û hespên gewra he-
sinî berbi warê başûr ve derketin.
7 Û hespên xwurt derketin û bona
ku li rûyê erdê bigerin xwestin ku
herin û got: Herin û li rûyê erdê
bigerin! Û li rûyê erdê geriyan.
8 Û bangî min kir û bi min re axifî
û got: Binêre, yên ku berbi warê
bakur hildikişin, li warê bakur
ruhê min aş kirin.

*Taca ku didin Yêşû*

Zeb 110,1-4; Îbr 7; 8,1

9 Û vê gotina XUDAN ji min re
hat: 10 Ji zilamên sirgûniyê, ji
Heldayê, Tobiya û Yedaya bigire
û tu wê rojê were mala Yoşiyayê
lawê Tsêfanya, ji wî xaniyê ku
ew ji Babîlê hatine wê û bikeve
hundir 11 û ji wan zîv û zêr bis-
tîne û tacan çêbike û wan deyne
serê kahînê mezin Yeşûyê lawê
Yehotsadak 12 û pê re biaxife û
bibêje: XUDANê artêşan bi vî
awayî diaxife û dibêje: A vay, zi-
lamê ku navê wî Zîl e û ew ê ji cihê
ku sekiniye aj bide û dê Perestge-
ha XUDAN ava bike; 13 belê, yê
ku dê Perestgeha XUDAN ava
bike ew e û dê rewnaqî li ser wî
be û dê rûnê û dê li ser textê xwe
serweriyê bajo û dê li ser texta wî
kahîn hebe û dê di nav herduyan
de şîreta wî ya aşitiyê hebe. 14 Û
bona ku ji Helem re û ji Tobiya
re û ji Yedaya re û ji Henê lawê
Tsefanya re bibe bîranînek, dê ev
tacan di Perestgeha XUDAN de
bin. 15 Yên li dûrê ne jî dê werin
û di Perestgeha XUDAN de kar-
keriyê bikin û hûn ê bizanibin ku
XUDANê artêşan min şandiye. Û
ger hûn bi qencî gotina Xwedayê
xwe XUDAN guhdarî bikin, dê
vana bibin.

*Ne rojî, lê Dadî û Dilovanî*

Îşa 58,3-10; Hoş 6,6; Mîk 6,8

7 Û di çar saliya qiral Daryûs de
wusa bû ku, di roja çaremîn ya
meha nehan de, di meha Kîslevê de
gotina XUDAN ji Zekarya re hat.
2 Û gelê Beytelê bona ku sayeya

XUDAN bixwazin 3 û bona ku ji
kahîn û peyxamberên ku li mala
XUDANê artêşan e re, bi gotina:
Gelo mîna ku ji gellek salan e
ez dikim, di meha pêncemîn de
dîsa parêzê bikim û bigirîm?
bipirsin, Şaretser û Regem-Melek
û zilamên xwe şandibûn. 4 Û vê
gotina XUDANê artêşan ji min re
hat: 5 Bi hemûya netewa welêt ve
û bi kahînan ve biaxife û ji wan re
bibêje: Ma di vê heftê salî de, dema
we di meha pêncemîn û meha
heftemîn de rojiyê digirtin û li xwe
dixistin[1] ma we ji min re, bona
min rojiyê girtin? 6 Û ma dema
hûn dixwin û vedixwin bona xwe
naxwin û bona xwe venaxwin?
7 Çawa ku li Orşelîmê dema gel
rûdinişt û bajar rehet bû û li bajarên
ku li dora wê ne û li başûrê[2] û dema
gel li Şefalayê[3] rûdinişt, gotinên ku
XUDAN bi destê peyxamberên
berê bang kiriye, ma ne vana ne?
8 Û vê gotina XUDAN ji Zeker-
ya re hat: 9 XUDANê artêşan, bi
gotina: Bi rastî darizandinê bikin
û bila her kes xêr û dilovaniyê ji
birayê xwe re bike 10 û tengasiyê
nedin jinebiyê û sêwî û biyan û
belengaz û bila tu kes li dijî birayê
xwe pêşniyara xerabiyê neke! go-
tibû. 11 Lê belê wan nexwestin
ku guhdarî bikin û bi inyadê pişta
xwe zivirandin û bona ku nebihî-
zin guhên xwe girtin. 12 Û bona
Ruhê XUDANê artêşan û zagon û
gotinên ku bi destê peyxamberên
berê ve şandiye guhdarî nekin,
dilên xwe mîna almastê hişk kirin
û ji XUDANê artêşan ve hêrsek
mezin bû. 13 Û wusa bû ku, çawa
ku dema wî bang dikir wan guh-
darî nedikirin, XUDANê artêşan
got: Dê ew ê bang bikin, ez ê jî
guhdarî nekim 14 û ez ê wan di
nav neteweyên ku nas nakin de,
mîna bahozê belav bikim. Û li
pêy wan welat wêran bû, ûsa ku,
tu kesê ji hundirê wê derbas dibe
û vedigere nema; warê xweşik
wêran kirin.

*XUDAN bona pîrozkirina Orşelîmê sozê dide*

Yêr 30,18-22; Îşa 2,1-3; Hag 2

8 Û vê gotina XUDANê artêşan
ji min re hat: 2 XUDANê
artêşan wusa dibêje: Ez bi çavne-
bariyek mezin xîretê li Siyonê di-
kim; belê, bi hêrsekî mezin xîretê
lê dikim. 3 XUDAN wusa dibêje:
Ez vegeriyam Siyonê û ez ê di
hundirê Orşelîmê de rûnim û dê
ji Orşelîmê re bajarê Rasteqîniyê
û ji çiyayê XUDANê artêşan re
Çiyayê Pîroz bête gotin. 4 XU-
DANê artêşan wusa dibêje: Wekî

[1] An jî: Xwe rûdiçikandin.
[2] Bi Îbranîtî Negeb, aliyê başûrê Cihûdayê.
[3] Cîhê çiyayî yê li rojhilata zozana qeraxê ye.

ji ber zêdeyiya temenên xwe di
destê her yekî de çoyên wan jin
û mêrên kalepîr, dê dîsa di qadên
Orşelîmê de rûnin. 5 Û dê bi lawik
û qîzikan yên ku di qadên bajêr
de dilîzin ve qadên wê tijî bibin.
6 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Ger ev di wan rojan de di çavên
maweyê vê neteweyê de bibe
tiştekî şaşkir, ma dê di çavên min
de jî bibe tiştekî şaş dike? Gotina
XUDANê artêşan. 7 XUDANê
artêşan wusa dibêje: A vay, ez ê
vê neteweya xwe ji warê rojhilatê
û ji warê rojavayê xelas bikim 8
û ez ê wan bînim û dê di hundirê
Orşelîmê de rûnin û ew ê bibin
neteweya min û ez ê bi rastî û bi
dadiyê bibim Xwedayê wan.
9 XUDANê artêşan wusa dibêje:
Bila destên we xwurt bin, hûn
ku, di van rojan de van gotinan ji
devê peyxamberan ve dibihîzin;
ew peyxamberên ku, bona mala
XUDANê artêşan, Perestgehê ava
bikin di roja ku bingeha wê hatiye
danîn de, li wê derê bûn! 10 Ji ber
ku berî wan rojan ji mirov re ro-
jane tunebû û ji heywan re rojane
tunebû û ji yê ku ji ber neyarê xwe
diketê û derdiket re xweşî[1] tunebû;
ji ber ku her zilamî li dijî hevalê wî
berdabûm. 11 Lê belê niha bona
maweya vê neteweyê mîna rojên
berê ez çawabûm ez ê wusa nebim,
gotina XUDANê artêşan. 12 Ji ber
ku dê tova xweşiyê hebe; dê dalît[2]
fêkiyê xwe bide û dê ax berê[3] xwe
bide û dê ezman xunavê xwe bide
û ez ê hemûyên vana ji maweyê vê
netewê re bi mêrasî bidim. 13 Û
ya mala Cihûda û mala Îsraêl, dê
wusa bibe ku, di nav neteweyan de
hûn çawa bûbûn naletek, ez ê we
bi wî avayî xelas bikim ku, hûn ê
bibin bereketek. Metirsin, bila des-
tên we xwurt bibin!
14 Ji ber ku XUDANê artêşan
wusa dibêje: Dema bapîrên we
min hêrs kirin çawa fikirîm ku
xerabiyê bi we bikim û çawa
poşman nebûbim, XUDANê
artêşan dibêje; 15 di van rojan de
ji Orşelîmê re û ji mala Cihûda re
dîsa qencî kirinê jî wusa fikirîm;
metirsin! 16 Tiştên ku hûn ê bikin
vana ne: Bila her kes ya rast ji
cîranê xwe re bibêje; di deriyê
xwe de daraziya rastî û xweşiyê
bidin 17 û bila tu kes di dilê xwe
de li dijî cîranê xwe pêşniyara xe-
rabiyê neke û ji sonda derewa ve
hez nekin; ji ber ku ez ji hemûyên
vana dikerihim, gotina XUDAN.
18 Û vê gotina XUDANê artêşan
ji min re hat: 19 XUDANê
artêşan wusa dibêje: Rojiya meha
çaremîn û rojiya pêncemîn û ro-

1 Aştî.
2 Mêw.
3 Zad.

jiya heftemîn û rojiya dehemîn,
dê bona mala Cihûda bibe xweşî
û şahî û cejnên xweşik; lê hûn ji
rastî û xweşiyê hez bikin! 20 XU-
DANê artêşan wusa dibêje: Dê
neteweyan û gelên pirr bajaran
hîn werin 21 û yên ku li bajarekî
rûdinin dê herin û ji yekî din re bi-
bêjin: Bona xwestina sayeya XU-
DAN û bona ku em li XUDANê
artêşan bigerin, ka hema em he-
rin, ez jî diçim! 22 Û bona ku li
Orşelîmê li XUDANê artêşan bi-
gerin û sayeya XUDAN bixwa-
zin, dê pirr netewe û gelên xwurt
werin. 23 XUDANê artêşan wusa
dibêje: Di wan rojan de ji her tew-
rê zimanên neteweyan dê deh kes
bi dawa kesekî Cihûdî ve bigirin
û dê bi gotina: Em bi we re herin,
ji ber, me bihîstin ku Xwedê bi
we re ye!

*Daraziya ji neyarên Îsraêlê re*

9 Barê gotina XUDAN li ser
welatê Hadrakê û bajarê
Şamê; ji ber ku çavê XUDAN li
ser mirovan û li ser hemû ezbetên
Îsraêlê ye 2 û bajarê Hamatê yê
ku li sînorê wê ye jî û çawa ku
zehf bi zanyar in, lê bajarên Sûr û
Sayda jî qonaxên wî barî ne. 3 Û
Sûr ji xwe re bircê ava kir û mîna
axê zîv û mîna heriya kuçê zêrê
saf kom kirin[1]. 4 A vay, dê Xu-
dan wê biqewirîne û li behrê dê li
quweta wê bixe û ew ê bi agir ve
bête daqurtandin. 5 Dê Aşkelon
bibîne û bitirse; Gaza jî dê zehf
janê bikişîne; Ekron jî, ji ber ku
dê hêviya wê vala derkeve û dê
qiral ji Gazayê ve bête rakirin û
kesî ku li Aşkelonê rûnê dê tune
be. 6 Û dê li Aşdodê neteweyek
dureh[2] rûnê û ez ê kubra Filistiyan
bişkînim. 7 Û ez ê ji devê wê xwî-
na wê û ji nav diranên wê tiştên
wê yî mekrûh rakim û dê ew ê
jî bona Xwedayê me wekî ma-
weyekê bimîne û dê li Cihûdayê
mîna mîrekî û dê Ekron bibe mîna
Yebûsiyek.
8 Û bona tu kesê ku here û were
nebe, li dijî artêşê ez ê li dora
mala xwe artêşgehekê ava bikim
û yê ku tengasiyê dide wan êdî di
nav wan de derbas nebe; ji ber ku
niha bi çavê xwe ve dîtim.

*Qiralê ku hatiye wad kirin*

9 Ya qîza Siyonê, bi kêfxweşiya
mezin ve bicoşe! Ya qîza
Orşelîmê, bang bike! A vay, qi-
ralê te bi dadî ye û xelasker e; dil-
nizm e û li ser kerekî, belê, li ser
dahşika kerekî siwar bûye û ji te
re tê. 10 Û ez ê ji Efrayîmê ereba
cengê û ji Orşelîmê hespê jêbikim
û bavêjim û dê kevana cengê
bête jêkirin û avêtin û dê gotina

[1] Berhev kirin, an jî: Dan hev.

[2] Melez.

xweşiyê ji neteweyan re bibêje û
serweriya wî ji behrê heta behrê û
ji çem[1] heta nîçikên rûyê erdê be.
11 Û dema em werin rewşa te; ji
ber xwîna peymana te, min dîlên
te ji kortala ku di tê de av nîne de
berdan. 12 Vegerin bircê ya hûn,
dîlên hêviyê! Tam di vê rojê de
ez daxuyanî dikim ku, ez ê bi du
qatî bidim te. 13 Ji ber ku min
Cihûdayê bona xwe wekî kevan-
ek damezirand û Efrayîmê mîna
tîrê dagirtim wê; ya Siyon, ez ê
lawên te hişyar bikim, ya welatê
Yewnan, li dijî lawên te! Û ez ê te
bikim mîna şûrê egîdekî.

*Dê XUDAN were*

Yêr 31,10-14

14 Û dê XUDAN di ser wan de
xuyanî bibe û dê tîra wî mîna
birûskekê derkeve û dê Xudan,
XUDAN li boriyê bixe û dê bi
bahozên başûrê ve bimeşe. 15 Dê
XUDANê artêşan wan biparêze
û dê bixwin û biqedînin û dê ke-
virên qusikê bigirin bin pêlan û dê
vexwin û dê mîna xemrê vexwari-
bin şemateyê bikin û dê mîna lega-
nan, mîna quncikên pêşkêşîgehê
tijî bibin. 16 Û wê rojê Xwedayê
wan XUDAN dê wan bi gotina
keriyê netewa min xelas bike; ji
ber ku dê ew ê bibin kevirên tacê
yên ku di welatê wî de dibiriqin.
17 Ji ber ku qenciya wî çi mezin
e û xweşikiya wî çi mezin e! Dê
xort bi genim û qîz bi xemra nû ve
geş û mezin bibin!

*Dê XUDAN Cihûda û Efrayîm bihêvişîne*

10 Di dema baranên dawîn de
ji XUDAN, ji XUDANê
ku birûskan diafirîne, baranê bi-
xwazin û dê ew ê taviya baranê
bide wan û di zeviyê de gîha bide
her kesî. 2 Ji ber ku terafîm tiştên
vala gotin û remildaran tiştên de-
rew dîtin û xewnên bi fenekî go-
tin û li cîhê vala xemrevîniyê di-
kin; ji ber vê yekê ew mîna keriyê
koç dikin, perîşan dibin, ji ber ku
şivan nîne. 3 Li dijî şivanan hêrsa
min sor bû û ez ê ceza nêriyan bi-
dim; ji ber ku XUDANê artêşan
sehêtiyê li keriyê xwe, li mala
Cihûda re kir û dê di cengê de
wan bike mîna hespê xwe yî şer
yê bi rewnaq. 4 Kevirê quncikê
ji wî[2], singê çadirê ji wî, kevana
cengê ji wî, dê hemûyên xwedi-
yê daraziyê ji wî derkevin. 5 Û dê
wusa bibin ku, dê mîna egîdên di
cengê de neyarên xwe di nav heri-
ya kuçê de dicûn bibin û dê cengê
bikin, ji ber ku XUDAN bi wan re
ye û dê yên ku li hespan siwar di-
bin şermezar bikin. 6 Û ez ê mala
Cihûdayê xwurttir bikim û mala

1 Çemê Feratê.
2 Ji Cihûda.

Ûsiv xelas bikim; ez ê wan şunda
bînim; ji ber ku ji wan re dilovani-
yê kirim û dê wusa bibe ku, mîna
wan neqewirandibim; ji ber ku ez
Xwedayê wan XUDAN im û ez ê
bersivê bidim wan. 7 Û yên ku ji
Efrayîmê ne dê mîna egîdan bin û
wekî xemrê vexwaribin, dê dilên
wan bicoşin û dê lawên wan vêya
bibînin û kêfxweş bibin û dê dilên
wan bi XUDAN ve ji kêfxweşiyê
bicoşin.
8 Ez ê bi wan bifikim û wan bidim
hev; ji ber ku wan bi fidyê ve xe-
las kirim û çawa zêde bûbin, dê bi
wî avayî zêde bibin. 9 Û ez ê wan
di nav neteweyan de biçînim û dê
li welatên dûr min di bîra xwe de
bînin û dê tevî zarokên xwe bijîn
û dê vegerin. 10 Û ez ê dîsa wan
ji welatê Misirê bînim û ez ê ji
Asûrê wan bidim hev û ez ê wan
bînim warê Gîleadê û Lubnanê û
dê cîhekî têra wan bike neyê dîtin.
11 Û dê ji behra tengasiyê ve der-
bas bibe û li behrê li şepalan bixe
û dê hemû cihên kûr yên Nîlê ziwa
bibin û dê kubra Asûrê bişkê û dê
çoyê Misirê ji dest ve here. 12 Û
ez ê wan bi XUDAN ve xwurt
bikim û dê bi navê wî ve bigerin,
gotina XUDAN.

*Du Şivan*

11 Ya Lubnan, deriyê xwe
veke ku bila agir darên te yî
erzê bixwe û biqedîne! 2 Ya darê
serwiyê, biûre! Ji ber ku darê erzê
ket, ji ber ku yên bi nav û deng in
helaq bûn; çiloyên Başanê, biûrin!
Ji ber daristana ku jê ve nayê der-
bas kirin xera bû. 3 Dengê ûrîna
şivanan! Ji ber ku mezintiya wan
hate xopan kirin; dengê gurmîni-
ya şêrên ciwan! Ji ber ku xirûra
Urdunê hate xopan kirin!
4 Xwedayê min XUDAN wusa
dibêje: Keriyê ku dê serjê bikin,
muheqeq tu bajo; 5 ew keriyê ku,
yên ku wan distînin wan serjê di-
kin û xwe bêguneh dihesibînin;
yên ku wan difroşin jî: Bila XU-
DAN pîroz bibe, ji ber ku ez dew-
lemend dibim! dibêjin û heyfa
şivanên mîhan li pez nayê. 6 Ji
ber ku êdî dê heyfa min li yên ku
li welêt rûdinin neyê, gotina XU-
DAN û a vay, ez ê mirovan, her
kesî bidim destên cîranên wan û
destê qiralên wan û dê li welêt
bixin û ez ê ji destên wan xelas
nekim. 7 Min jî keriyê ku tête ser-
jê kirin, di keriyê de yên bi rastî
jî zebûn in ajot. Û ji xwe re du
çoyî rahiştim; navê Saye li yekê û
navê Yekîtiyê li yê din kirim û ke-
riyê ajotim. 8 Û di mehekê de sê
şivanî jêkirim û avêtim; ji ber ku
canê min ji wan bêzar bû, canên
wan jî ji min kerihîn. 9 Û gotim:
Ez we najom, yê ku dimire bila
bimire û yê ku dê were jêkirin bila
were jêkirin; yên ku ji ber bimînin
jî, bila her yek goştê yê ku li cem

xwe ye bixwe. 10 Û çoyê xwe,
Saye rahiştim û bona peymana
xwe ya ku bi hemû neteweyan re
birrî me xera bikim wê şikandim.
11 Û peyman wê rojê xera bû û
zebûnên keriyê yên ku min guh-
darî dikirin bi vî awayî fêhm ki-
rin ku, ev gotina XUDAN bû. 12
Û ji wan re gotim: Ger di çavên
we de qenc be, mîşeya min bidin
û ger ne qenc be, dev jê berdin.
Û wekî mîşeya min be, sîh parîk
zîv wezinandin. 13 Û XUDAN
ji min re got: Ewêya, wê bihaya
herî qenc ya ku bi wê bihaya min
dane[1] rahêje û bavêje kûzikvan[2].
Û sîh parîk zîvî rahiştim û wan
di mala XUDAN de ji kûzikvan
re avêtim[3]. 14 Û bona biratiya
di nav Îsraêl û Cihûdayê de xera
bikim, çoyê xwe yî din, Yekîtiyê
jî şikandim.
15 Û XUDAN ji min re got: Dîsa
ji xwe re taximekî şivanên bêa-
qil rahêje! 16 Ji ber ku a vay, ez
ê şivanekî wusa li welêt deynim
ku, dê sehêtiyê li yên ku hatine
qewirandin neke û dê li yên ku
hatine belavbûyîn negere û dê yê
ku şikestina wî heye necebirîne
û dê yê ku saxlem e xwedî neke;
lê goştê mîhên qelew bixwe û dê
neynûkên[4] wan jê bike[5]. 17 Wey
li serê şivanê bêqîmet, yê ku keri-
yê berdide! Bila şûr li ser milê wî
û li ser çavê wî yê rastê be! Bila
milê wî bitûmî ziwa[6] bibe û çavê
wî yê rastê bitûmî kor bibe!

*Neyarên Orşelîmê tune dibin*

12 Li ser Îsraêlê barê gotina
XUDAN.
Gotina XUDAN yê ku ezmanan
şidandiye û bingeha erdê daniye
û di hundirê mirov de şikil daye
ruhê wî: 2 A vay, ez ê Orşelîmê
li hawirdorê ji hemû neteweyan
re bikim kaseyek ku serî gêj dike
û dê Cihûda jî mîna Orşelîmê
bête dorpêç kirin. 3 Û dê wê rojê
wusa bibe ku, ez ê Orşelîmê bona
hemû neteweyan bikim kevirekî
ku diwestîne; heçiyên ku wê li
xwe kirine bar dê bi birînên gi-
ran ve birîndar bibin û dê hemû
neteweyên erdê li dijî wê bicivin.
4 Wê rojê ez ê bi bêzariyê li her
hespî û bi haritiyê li her siwarî
bixim, gotina XUDAN û ez ê
çavê xwe bi ser mala Cihûda ve
vekim û bi koritiyê li her hespên
neteweyan bixim. 5 Û dê mîrên
Cihûdayê di dilê xwe de bibêjin:
Yên ku li Orşelîmê rûdinin, tevî
Xwedayê xwe XUDANê artêşan
hêza min in! 6 Wê rojê ez ê mîrên

---

1 Bihaya min pê dane, an jî: Pê danîne.
2 Kûzker, an jî: Pîrot.
3 An jî: Ji xezînê re avêtim.
4 Simên.
5 Biperçiqîne, an jî: Dê perçe bike.
6 An jî: Hişk.

Cihûdayê mîna manqila ku di nav
agir de dişewite û mîna pêtaleyek
ji nav demedan ve pêtan diweşîne
bikim û li hawirdorê li rast û çepê,
dê hemû neteweyan bixwin û bi-
qedînin û yên ku ji Orşelîmê ne
dê dîsa li cihê xwe, li Orşelîmê
rûnin. 7 Û dê XUDAN pêşiyê
çadirên Cihûdayê xelas bike, da
ku, bila pesnahiya mala Dawid
û pesnahiya yên ku li Orşelîmê
rûdinin, ne ji Cihûdayê seretatir
bin. 8 Dê XUDAN wê rojê yên
ku li Orşelîmê rûdinin biparêze û
wê rojê dê di nav wan de zilamê
lawaz mîna Dawid û mala Dawid
mîna Xwedê, dê li ber wan bibe
mîna milyaketê XUDAN. 9 Û dê
wê rojê wusa bibe ku, ez ê li he-
laqiya hemû neteweyên ku bi ser
Orşelîmê ve têne bigerim.
10 Û ez ê ruhê saye û lavayê bi
ser mala Dawid û bi ser yên ku li
Orşelîmê rûdinin ve birijînim û dê
li min, li zilamê ku bedena wî qul
kirine binêrin û mîna yê ku bona
lawê xwe yî tekane şînê digire,
dê bona wî şînê bigirin û mîna yê
ku bona lawê xwe yî pêşîn janê
dikişîne dê bona wî janê bikişînin.
11 Wê rojê li Orşelîmê, mîna
şîna Hadadrîmmon ya di newala
Megîddonê de bûye, dê şînek me-
zin bibe. 12 Û welat, her eşîr ji bo
xwe şînê bikişînin û eşîra mala Da-
wid ji bo xwe û pîrekên wan ji bo
xwe û eşîra mala Natan ji bo xwe
û pîrekên wan ji bo xwe 13 û eşîra
mala Lêwî ji bo xwe û pîrekên
wan ji bo xwe û eşîra Şîmeyiyan
ji bo xwe û pîrekên wan ji bo xwe
14 û giştikên eşîrên ku li pêy mane
û her eşîr ji bo xwe û pîrekên wan
ji bo xwe şînê bikişînin.

*Peyxamberên sexte tên şermezarkirin*

13 Bona sûc û mindariyê paqij
bike, dê wê rojê ji mala
Dawid re û ji yên ku li Orşelîmê
rûdinin re çavkaniyek vebe. 2 Û
dê wê rojê wusa bibe ku, gotina
XUDANê artêşan, ez ê navên
pûtan ji welêt ve jêkim û bavêjim
û êdî neyên bîranîn; ez ê peyxam-
beran jî, ruhê mindar jî ji welêt ve
bibim. 3 Û dê wusa bibe ku, ger
kesek dîsa jî peyxambertiyê bike,
wê çaxê dayika ku wî aniye dinê
û bavê wî dê jê re bibêjin: Tuyê
nejî; ji ber ku tu bi navê XUDAN
derewan dibêje! Û dema pey-
xambertiyê bike, dê dayika ku
wî aniye dinê û bavê wî bedena
wî qul bikin û biqelişînin. 4 Û dê
wê rojê wusa bibe ku, peyxamber
şerm bikin, dema peyxambertiyê
bike, dê her kes ji xewn û xeyala
xwe şerm bike û bona ku bixapî-
ne dê qeftanê ji mû li xwe neke
5 û dê bibêje: Ez ne peyxamber
im, zilamekî cotkar im[1]; ji ber ku
di ciwantiya min de zilamekî min

[1] Rêncber, an jî: Karkerekî erdan im.

ji xwe re kir kole. 6 Û dê yek jê re
bibêje: Ev birînên ku di nav destê
te de ne çi ne? Û dê ew bibêje:
Birînên ku li mala hezkirên[1] xwe
girtime!

*Şivan têle lêxistin*

7 Ya şûr, li dijî şivanê min, li dijî
zilamê ku hevalê min e hişyar
bibe! Gotina XUDANê artêşan;
li şivan bixe ku, bila mîh belav
bibin û ez ê destê xwe li dijî biçû-
kan bizivirînim. 8 Û dê wusa bibe
ku, li hemûya welêt, gotina XU-
DAN, dê li wir du par bête jêkirin
û avêtin û dê bimire û dê li wir ji
sisiyan yek li pêy bimîne. 9 Û ez
ê vê ji sisiyan yekê bixim agir û
mîna ku zîvê safî dikin ez ê wan
safî bikim û mîna ku zêrê dice-
ribînin ez ê wan biceribînim. Ew
ê bangî navê min bikin û ez ê ber-
sivê bidim wan; ezê: Netewa min
ew e! bibêjim û ew ê jî: Xwedayê
min XUDAN e! bibêje.

*Hatin û Qiraletiya Mesîh*
Lûq 21,24-28; K.Şa 1,9-12

14 A vay, roja XUDAN tê û dê
malê te yî talanê di hundirê
te de par bikin. 2 Ji ber ku ez ê
hemû neteweyan li dijî Orşelîmê ji
cengê re bicivînim û dê bajar bête
stendin û xanî bên talan kirin û dê
destên xwe dirêjî namûsa pîrekan
bikin û dê nêviyê bajêr derkeve
sirgûnê, lê pêşmayiyên netewê dê
ji bajêr ve neyên birrîn û avêtin.
3 Wê gavê dê XUDAN derkeve û
di roja şer de çawa ceng kiribe, dê
li dijî wan neteweyan bi wî avayî
cengê bike. 4 Û wê rojê dê lingên
wî li ser çiyayê Zeytûniyê ya ku li
rojhilatê, li ber Orşelîmê ye bise-
kinin û dê çiyayê Zeytûniyê ber ve
rojhilatê û rojavayê ji navenda xwe
ve biqelişe û dê bibe geliyekî zehf
mezin û dê nêviyê çiyê berbi bakur
û nêviyê din berbi başûr ve bête
vekişandin. 5 Û hûn ê bi rêya geli-
yê çiyayê min ve birevin; ji ber ku
dê geliyê çiyê bigihêje Atselê û di
rojên Ûzziyayê qiralê Cihûdayê de
hûn ji ber erdhejînê çawa reviya-
bin, hûn ê wusa birevin û wê gavê
dê Xwedayê min XUDAN tevî
hemû pîrozan were[2]! 6 Û wê rojê
dê wusa bibe ku, dê ronahî tune be,
yên ku dibiriqin dê tarî bibin; 7 lê
belê dê bibe rojek ku XUDAN pê
dizane; dê roj jî nebe, şev jî nebe û
dê wusa bibe ku, êvarê dê ronahî
hebe. 8 Û di wê rojê de dê wusa
bibe ku, dê ji Orşelîmê avên zindî
derkevin; dê nêviyê wan bi behra
rojhilatê ve û nêviyê wan jî berbi
behra rojavayê biherikin; dê ha-
vînê jî, zivistanê jî wusa bibe.

*1* Hevalên.
*2* An jî: ...dê Xwedayê min XUDAN were û hemû pîrozên wî pê re!

9 Û dê li ser hemûya dinê XUDAN
bibe qiral; dê wê rojê XUDAN yek
û navê wî yek be. 10 Ji Gebayê heta
Rîmmona ku li başûrê Orşelîmê
ye, dê hemûya welêt mîna Arabayê
bête kirin û dê Orşelîm bilind be û
ji Deriyê Benyamîn heta cîhê deri-
yê yekemîn, heta Deriyê Quncikê
û ji qûleya Hananel heta mahse-
reyên qiral dê li cihê xwe rûnê.
11 Û dê li wir mirov rûnin û êdî
nalet dê tune be û dê Orşelîm di
ewlekariyê de rûne.
12 Û dê asîw ev be, ew asîwa ku,
dê XUDAN bi wê li hemû nete-
weyên ku li dijî Orşelîmê cengê
kirine bixe; çawa ku dema li ser
lingên xwe disekinin dê goştên
wan buhule û dê çavên wan di
kortalên xwe de buhule û dê di
devên wan de zimanên wan bu-
hule. 13 Û dê wê rojê wusa bibe
ku, di hundirê wan de dê ji aliyê
XUDAN ve şikestinek mezin
bibe û dê her kes bi destê cîranê
xwe ve bigire û dê destê yekî li
dijî destê yê din derkeve. 14 Û
dê Cihûda jî li Orşelîmê cengê
bike û li hawirdorê serweta hemû
neteweyan zêr û zîv û kinc, bi
zêdeyî bête kom kirin[1]. 15 Û dê
asîwa hespê te, kerê te û deveyê
te û asîwa hemû heywanên te yên
di wan artêşgehan de ne jî wusa,
mîna wê asîwa bin.
16 Û dê wusa bibe ku, her kesê
ku ji ber hemû neteweyên ku li
dijî Orşelîmê meşiyane mayîne,
ji salê heta salê bona ku peristinê
ji XUDANê artêşan Qiral re bikin
û Cejna Çardaxan pîroz bikin, dê
hilkişin. 17 Û dê wusa bibe ku, ji
eşîrên dinê her kî bona ku ji XU-
DANê artêşan re, ji Qiral re pe-
ristinê bike dernekeve Orşelîmê,
dê baran bi ser wan ve nebare.
18 Û ger eşîra Misiriyan derneke-
ve û neyê, dê li ser wan jî nebe;
dê asîw ev be, ew asîwa ku dê
XUDAN bi wê li neteweyên bona
pîroz kirina Cejna Çardaxan der-
nekevin bixine. 19 Dê cezê Mi-
sirê û cezê hemû neteweyên ku
bona pîroz kirina Cejna Çardaxan
dernekevin ev be. 20 Dê wê rojê li
ser zengilkên hespan: Ji XUDAN
re pîroz, nivîsandî bin û qazanên
ku li mala XUDAN in, dê bibin
mîna leganên li ber pêşkêşîgehê
ne. 21 Û li Orşelîmê û li Cihûdayê
her qazan dê ji XUDANê artêşan
re pîroz be û hemûyên ku qurbanê
serjê dikin, dê werin û ji wan
rahêjin û di wan de bikelînin û wê
rojê di mala XUDANê artêşan de
êdî yekî Kenanî neyê dîtin.

[1] Bête civandin, an jî: Dê bidin hev.

# MALEYAXÎ

*Pêşgotin*

Bûyerên ku di pirtûka Maleyaxî de derbas dibin, paşî ku li Orşelîmê perestgeh hate avakirin, B.Z. di sedsala 5'an de hatin nivîsandin. Banga Peyxamber Maleyaxî; ji gel û kahînan re, li ser nûkirina dilsoziya ji Xwedê re ye. Di jiyan û ji Xwedê re peristina gelê Xwedê de, guh nedan û guneh hebû. Gel û kahînan deheka ku divê bidana Xwedê nedidan û bi vî awayî fenekiyê dikirin û bi dilekî pak pêşkêşiyê jê re pêşkêş nedikirin. Li gor hînkariya wî jî nedijiyan. Lê belê Xudan, bona ku rê amade bike û peyxama xwe bide xuyakirin, dê nûçegîhanê xwe ji pêşiya xwe ve bişîne, paşê dê ew bi xwe were û gel biceza û pak bike.

*Xetên Bingehîn:*

| | |
|---|---|
| 1:1-2:16 | Gunehê gelê Îsraêlê |
| 2:17-4:6 | Darazî û dilşewatiya Xwedê |

*XUDAN ji Îsraêlê hez dike*

Rom 9,10-13

1 Bi destê Maleyaxî ve ji Îsraêlê
re, barê gotina XUDAN.
2 Ji we hez kirim, XUDAN
dibêje. Û hûn: Ma te bi çi ji me
hez kir? dibêjin. Ma Esav ne bi-
rayê Aqûp bû? gotina XUDAN
û min ji Aqûp hez kir 3 û ji Esav
kerihîm û çiyayên wî wêran kirim
û mêrasa wî dam çeqelên çolê.
4 Madem ku Edom: Em eciqîn, lê
belê em ê vegerin û em ê xerabe-
yan ava bikin dibêje; XUDANê
artêşan wusa dibêje: Dê ew ê ava
bikin, lê belê ez ê xera bikim û dê
ji wan re: Sînorê xerabiyê û: Ne-
tewa ku XUDAN abadîn lê hatiye
xezebê, bên gotin. 5 Û dê çavên
we bibînin û hûn ê: XUDAN ji
sînorê Îsraêlê wêdetir ve jî mezin
e! bibêjin.

*XUDAN Kahînan îkaz dike*

6 Law ji bavê xwe re û qûl ji efen-
diyê xwe re hurmetê dike; kahînên
ku navê min biçûk dibînin, ger ez
bav bim, ma kanê mezintiya min?
Ger ez efendî bim, ma kanê tirsa
ji min? XUDANê artêşan ji we re

dibêje. Û hûn: Ma me çawa navê
te biçûk dîtin? dibêjin. 7 Hûn li
ser pêşkêşîgeha min nanê mindar
pêşkêş dikin. Û hûn: Ma me te bi çi
mindar kirin? dibêjin. Bi gotina we
ya: Sifra XUDAN tiştekî ku divê
biçûk bête dîtine. 8 Û dema hûn bi
qurbanî heywanê kor pêşkêş dikin,
qey ne tiştekî xerab e û dema hûn
ya kulek û nexweş pêşkêş dikin,
ma ev jî ne xerab e? De ji waliyê
xwe re wê pêşkêş bike, gelo dê ji
te razî bibe? An jî dê te giramî bi-
gire? XUDANê artêşan dibêje. 9
Û niha, ka sayeya Xwedê bixwa-
zin ku, bila ji me re xêrê bike! Ev
bi destê we ve bû; ma ew ê di nav
we de dê kesî qebûl bike? XU-
DANê artêşan dibêje. 10 Xwezîka
di nav we de yek hebûya û deriyan
bigirta ku hûn li ser pêşkêşîgeha
min li cîhê vala agirê vênexin! Ez
ji we ne dilxweş im, XUDANê
artêşan dibêje û ez razî nabim ku
ji destê we pêşkêşiyê rahêlim. 11
Ji ber ku dê navê min ji cîhê hila-
tina rojê heta cîhê ku diçe ava, di
nav neteweyan de mezin be û dê
li her derê ji navê min re buxur
bên şewitandin û dê pêşkêşiya
paqij bête pêşkêşî kirin; ji ber ku
dê navê min di nav neteweyan
de mezin be, XUDANê artêşan
dibêje. 12 Lê belê hûn bi gotina:
Sifra Xudan mindar e û derame-
ta[1] wî, xwarina wî ji rêze ye wê
xera dikin. 13 Û hûn: A vay, ev
çi westandine! dibêjin û jê re uf û
pif dikin, XUDANê artêşan dibêje
û hûn ya hatiye dizîn, ya kulek û
ya nexweş tînin, hûn pêşkêşiyê
wusa tînin; ma ez wê bi rizê ji
destê we distînim? XUDAN
dibêje. 14 Û feneke, çawa ku di
keriya wî de heywanê nêr heye, lê
qewlê dide û ya biqisûr ji Xudan re
qurban dike, bila bi nalet be! Ji ber
ku ez Qiralê mezin im, XUDANê
artêşan dibêje û di nav neteweyan
de navê min tirsehêz e.

2 Û niha ya kahînno, ev emir
bona we ye! 2 Ger hûn guh-
darî nekin û mezintî dayîna navê
min nexin dilê xwe, XUDANê
artêşan dibêje, ez ê naletê bi ser we
ve bişînim û ez ê naletê li duayên
we yî berdariyê bikim û jixwe min
naletê li wan kir, ji ber ku hûn wê
naxin dilê xwe. 3 A vay, ez ê tova
we birizînim û sergînê bi wecên
we bireşînim, sergînê qurbanê yên
cejnên we û hûn ê bi wê ve bêne
birin. 4 Û bona ku bi Lêwî re pey-
mana min hebe, hûn ê bizanibin
ku vî emrî min ji we re şandiye,
XUDANê artêşan dibêje. 5 Bi wî
re peymana min jiyan û xweşî bû
û bona ku bitirse wan dam wî û
ji min tirsiya û ji navê min lerizî.
6 Zagona rastiyê di devê wî de
bû û di lêvên wî de neheqî nehat

[1] Waridat.

dîtin; bi min re di xweşî û rastiyê de meşiya û gellek zilaman ji fesadiyê vegerand. 7 Ji ber ku divê lêvên kahîn zanînê biparêze û divê mirov di devê wî de li zagonê bigerin; ji ber ku nûçegîhanê XUDANê artêşan e. 8 Lê belê hûn ji rê çewt bûn û we bi hînkariyên xwe ve gellek zilaman di zagonê de çerixandin[1]. We peymana Lêwî xera kir! XUDANê artêşan dibêje. 9 Û çawa we bi rêyên min ve negirtibin û di zagonê de ji kesan re giramî girtin, min jî we li ber hemûya netewê wusa bêqîmet û nizm kirin.

*Îxaneta gelê Cihûda ji XUDAN re*

10 Ma bavê me hemûyan ne yek e? Ma Xwedayekî me ne afirand? Ma çima her kes peymana bapîrên me xera dikin û ji birayê xwe re xayîntiyê dikin? 11 Cihûda xayîntiyê kir û li Îsraêlê û li Orşelîmê tiştê mekrûh bikar anî; ji ber ku Cihûda cîhê piroz, yê ku XUDAN jê hez dike mindar kir û bi qîza îlahê biyan re zewicî. 12 Dê XUDAN, zilamê ku ji çadirên Aqûp vêya kirine, yê ku hişyar disekine û yê ku bersivê dide û yê ku pêşkêşiyê ji XUDANê artêşan re pêşkêş dike, jêbike û bavêje. 13 Û hûn vêya jî dikin; bi hêstirên çavan, bi girî û bi nalînê pêşkêşîgeha XUDAN dadigrin ku êdî pêşkêşiyê nabîne û bi xweşiya dil wê ji destên we ranahêle. 14 Û hûn dibêjin: Çima? Ji ber ku XUDAN di navbera jina ciwantiya te û te de bû şahde, ew pîreka ku, heval û pîreka te, ya ku te bi wê re sondê xwariye yî, lê dîsa jî te xayîntiyê bi wê re kir. 15 Û çawa ku maweya ruh pê re bû, ma tenê nekir? Û ma çima tenê? Ji ber ku li nijadekî Xwedê digere. Hûn jî ruhê xwe biparêzin û bila tu kes ji pîreka ciwantiya xwe re xayîntiyê neke! 16 Ji ber ku Xwedayê Îsraêlê XUDAN dibêje: Ez ji hev berdanê[2] û ji zilamê ku kincê xwe bi xedariyê duxumîne dikerihim, XUDANê artêşan dibêje; bona vêya ruhên xwe biparêzin û xayîntiyê nekin!

*Roja Daraziyê nêzîk e*

Met 11,7-12

17 We bi gotinên xwe XUDAN bêzar kir û hûn: Ma me wî bi çi bêzar kir? dibêjin. Bi vî awayî axaftina xwe: Her zilamê ku xerabiyê dike, di çavên XUDAN de qenc e û ji wan dilxweş e, an jî, Xwedayê dadê li ku ye?

*Diziya dehekên ku hatine danîn*

3 A vay, ez nûçegîhanê xwe dişînim û dê di pêşiya min de

1 Hûn sûcdar in ku gellek zilaman di zagonê de çerixîne.

2 An jî: Jin berdanê.

rê amade bike û dê Xudanê ku hûn
lê digerin nişka ve were Perestge-
ha xwe û milyaketê peymanê ya
ku we bêriya wî kiriye, dê were, a
vay, tê, XUDANê artêşan dibêje.
2 Lê belê ma kî dikare li ber roja
hatina wî deyax bike? Û gava bête
xuya kirin, ma kî dikare bisekine?
Ji ber ku dê bibe mîna agirê kesê
ku lajwerdê safî dike û mîna kîla
yê ku diçerpîne 3 û dê mîna zi-
lamê ku zîv safî û paqij dike rûnê
û dê lawên Lêwî paqij bike û dê
wan mîna zêr û zîv safî bike û dê
bi rastiyê ji XUDAN re pêşkêşiyê
pêşkêş bike. 4 Û mîna rojên ke-
vin û mîna salên berê wusa ye, dê
pêşkêşiya Cihûdayê û pêşkêşiya
Orşelîmê ji XUDAN re xweş
werin. 5 Û bona daraziyê ez ê
nêzîkî we bibim û li dijî afsûnka-
ran û li dijî zinêkiran û li dijî yên
ku bi derewan sondê dixwin û di
mîşeya wan de bi yên ku bi mîşê
dixebite û li dijî yên ku ji jinbiyê
re û ji sêwî re bi xedarî dike û li
dijî yên ku mafê xerîb xwar dike
û li dijî yên ku ji min natirsin, ez ê
zû bibim şahde, XUDANê artêşan
dibêje. 6 Ji ber ku ez, XUDAN, ez
naguherim; ji ber vê yekê hûn, ya
lawên Aqûp, hûn tune nebûn.
7 Ji rojên bapîrên xwe ve hûn ji
zagonên min ve çewt bûn û we bi
wan negirtin. Vegerin min, ez ê
jî vegerim we, XUDANê artêşan
dibêje. Û hûn: Ma em bi çi vege-
rin? dibêjin. 8 Ma mirov dikare
Xwedê bişelîne? Lê belê hûn min
dişelînin. Û hûn: Ma me di çi de
te şelandin? dibêjin. Di dehekan
de û di pêşkêşiyan de. 9 Hûn zehf
binalet bûn; ji ber ku hûn hemûya
vê neteweyê, hûn min dişelînin!
10 Hemûya dehekiyê bînin mala
embarê ku, bila li mala min xwa-
rin hebe û niha min bi vêya bice-
ribînin, XUDANê artêşan dibêje,
ma gelo ez ê şivakeyên ezmanan
ji we re venekim û qasî ku têra we
dike zêdetir ez ê bereketê bi ser we
ve nerijînim? 11 Û ez ê bi yê ku
dixwe û diqedîne di oxra we de bi-
pekim û dê zadê axa we xera neke
û li beyarê mêwa we dê bê hilber
nebe, XUDANê artêşan dibêje.
12 Û dê hemû netewe ji we re bi-
bêjin dilgeş; ji ber ku hûn ê bibin
welatekî ku ji mirov re xweş tête
xuyanî kirin, XUDANê artêşan
dibêje.

13 Û gotinên we li dijî min tûnd
bûn, XUDAN dibêje. Û hûn:
Ma me li dijî te çi gotin? dibêjin.
14 We gotin: Ji Xwedê re qûlitî
kirin, tiştekî vala ye; me bi notir-
vaniya wî girtin û li ber XUDANê
artêşan ve şînê girtin û meşiyan, ma
çi qezenc bû? 15 Û niha em ji kesên
qure re dilgeş dibêjin; karên yên ku
xerabiyê dikin jî pêş ve diçin; Xwe-
dê jî diceribînin û xelas dibin.

16 Wê çaxê yên ku ji XUDAN di-
tirsin bi pev re axifîn û XUDAN

baş guhdarî kir û bihîst û bona
yên ku ji XUDAN ditirsin û navê
wî difikirin, li ber wî pirtûkek
bîranînê hate nivîsandin. 17 Û di
roja ku ez ê bikim de, dê ew ê bi-
bin yên min, dê bibin malên min
î xas, XUDANê artêşan dibêje û
zilamek lawê xwe yî qûlitiyê jê
re dike çawa biparêze, ez ê wan
wusa biparêzim. 18 Hûn ê wê
çaxê vegerin û di navbera yê sa-
lih û yê xerab de û di navbera yê
ku qûlitiyê ji Xwedê re dike û yê
ku jê re qûlitiyê nake de cihêtiyê
bikin.

*Roja XUDAN*

2.Pêt 3,7.10-14

4 Ji ber ku a vay, ew roj tê, mîna
firnê dişewite û hemûyên
qure û yên ku xerabiyê dikin,
dê bibin ka û roja ku di hatinê
de ye dê wan bişewitîne, XU-
DANê artêşan dibêje, wusa ku,
dê di wan de reh û gulî nehêlin.
2 Lê belê dê ji we re, ji yên ku ji
navê min ditirsin re, roja rastiyê
ya di bazikên xwe de çêbûnê tîne
dê hilê û hûn ê derkevin û hûn ê
mîna golikên axurê bipengizin. 3
Û hûn ê xeraban bigirin bin lin-
gan; ji ber ku di wê roja ku ez
dikim de, dê ew ê di bin navkoyê
lingên we de bibin xwelî, XU-
DANê artêşan dibêje.
4 Zagona qûlê min Mûsa, qaî-
deyan û daraziyan[1] di bîra xwe
de bînin, ew zagona ku, li Horebê
bona hemûya Îsraêlê min emir da
wî! 5 A vay, berî ku roja XUDAN
ya mezin û tirsehêz were, ez ê
peyxamber Êlyas ji we re bişînim.
6 Dê ew ê jî dilê bavan wergerîne
lawan û dilê lawan wergerîne ba-
van; da ku, ez werim û bi naletê li
dinê nexim!

1 Rêgez, prensîp.

# PEYMANA NÛ
# (ÎNCÎL)

# MIZGÎNIYA ÎSA MESÎH[1] LI GOR META

MESÎHÊ XWEDÊ: SERWER, HIKUMDAR

*Pêşgotin*

Ev beşa, birra Nûçeya Kêfxweşkirinê ya ku ji Meta re hatiye peyxam kirinê ye. Îsa di dema xizmeta xwe yî rûyê erdê de, bangî donzdeh şagirtên xwe kir. Dema Meta navê donzdeh şagirtên wî dide (10:3) xwe jî, bi navê: "Metayê xerca bacê dide hev" dide nasîn.

Meta, Cihûyekî li ser hisabê Romiyan xercê dida hev bû. Di eynî demê de bi navê: "Lêwiyê Lawê Alfêos" jî tê nasîn (Marq 2:17). Dema Îsa, bona ku şagirtiyê jê re bike, bangî Meta kir, wî jî hemû karên xwe berda û li pêy Îsa çû (Lûq 5:27,28). Meta endamê çînek ûsa bû ku, tu gel ji wê çînê hez nedikir. Lê belê li pêy banga Îsa çû û rêyekî din ji xwe re bijart. Xwarinek bi rewnaqî da û Îsayê ku ji wî re gotibû "li pêy min were" jî bangî vê şahiya kir (Lûq 5:29). Tê zanîn ku ev nivîsa, di nava sedsala yekemîn de, li Antaqyayê hatiye nivîsandin û ji bawerkirên pêşîn re bûye çavkaniyek mezin.

Îsayê ku Meta ji mirovan re nasîn daye, Mesîhê Xwedê ye, Qiralê ku dê were ye (2:2; 21:5; 22:11; 25:34; 27: 11,37,42). Îsa heyşt carî bi navê Lawê Dawid tê danasîn. Ew, Xulamê Xwedê yê ku Îşaya peyxamber qala wî kiriye (12:18), kesê ku nexweşî û derdên mirovan li xwe bar kiriye yî (8:17).

Îsa, maneyekê nû da zagonên ruhanî yên ku Xwedê di Peymana Kevin de daye xuya kirin (5:21-24,27-30,33-37) Girêdana derûnî ya ku ne bi tîpên (herfên) Zagonê, girêdana bi ruhê Zagonê gellekan, li ber wî (Nîjada olê ya bi şiklî bi wê ve girêdayî ye), windakirina Îsa ji xwe kirin armanca bingehîn. Ya dawîn jî di vê armanca xwe de bi ser ketin. Dê vî karê nîjada ku bi şiklî bi Zagonê ve girêdayî ne, bi vî awayî biçe dawiyê: Serweriya Xwedê dê ji wan bê standin û ji kesên berên qenc didin re bê dayîn (21:43).

Metayê Nivîskar, bûyerên ku nivîsandiye, dide xuyakirin ku ji aliyê peyxamberên Peymana Kevin ve bi eşkeretî hatiye şîrove kirin. Bi gotina: "Bi vî awayî gotina Peyxambertiyê hate cîh" jî vê rewşê dide ber çavan. 123 Caran gotinên peyxamberên Peymana Kevin dibêje û

[1] Încîla Îsa Mesîh.

vana çawa hev temam dikin, dide ber çavan. Di vê nivîsê de, gotina: "Serweriya Ezmanan" 30 caran tê gotin. Wekî din Meta bîst caran qala mûcîzetên Îsa dike. Pênc axaftinên Îsa, yên dirêj jî di vê nivîsa de cîh digire. Vana, bi van sernivîsan ve tên rêz kirin:

1. Seretayên kevneşopa sipî ya bi dilxweşiyê dest pê dike 5:1-7:27
2. Rastiyên ku berî destpêka xizmetê, Îsa ji şagirtên xwe re dide xuya kirin 10:1-42
3. Çîrokên wekokî yên di derheqê Serweriya Xwedê de ne 13:1-52
4. Têkiliyên qenc yên mirov û civakan 17:1-35
5. Gotinên Îsayê bi durûtiyê ve dipeke û di derbarê hatina wî yî duwemîn de ne 23:1-25:36

Ew daxuyanîkirina di derheqê vê babeta dawîn de ya ji peyxamberên Peymana Kevin ve hatine girtin, herî balkêş e (24:30).
Ev her pênc axaftin û qala wan tên kirin jî bi van gotinan ve diqedin: "Dema Îsa dawiya van gotinan anî..." (7:28; 11:1; 13:53; 19:1; 26:1).
Ev hînkariyên Îsa, di domiya deman de bûye sereta jiyanê û kevneşopa rastiya Civaka bawerkiran.

BÛYÎNA ÎSA MESÎH Û DEMA ZAROKANTIYA WÎ

*Nîjada Îsa Mesîh 1-17*
Lûq 3,23-38; K.Şa 13,23

1 Ev kitêba nîjada Îsa Mesîhê
lawê Dawidê, lawê Birahîm e:
2 Birahîm bavê Îshaq bû; Îshaq
bavê Aqûp bû; Aqûp bavê Cihûda
û birayên wî bû; 3 Cihûda bavê
Pêrez û Zerah, yên ku ji Tamara
ve welidîne bû; Pêrez bavê Hes-
rûn bû; Hesrûn bavê Aram bû;
4 Aram bavê Amînadab bû; Amîna-
dab bavê Nahşon bû; Nahşon bavê
Selman bû; 5 Selman bavê Boazê
ku ji Rehab ve welidiye bû; Boaz
bavê Obêdê ku ji Rût ve welidiye
bû; Obêd bavê Îşay bû 6 û Îşay
bavê qiral Dawid bû.
Qiral Dawid bavê Silêmanê ku ji
jina Ûriya ye bû; 7 Silêman bavê
Rehoboam bû; Rehoboam bavê
Aviya bû; Aviya bavê Asa bû;
8 Asa bavê Yoşafat bû; Yoşafat
bavê Yorem bû; Yorem bavê Ûzi-
ya bû; 9 Ûziya bavê Yotam bû;
Yotam bavê Ahaz bû; Ahaz bavê
Hîzkiya bû; 10 Hîzkiya bavê
Manaşşe bû; Manaşşe bavê Amon
bû; Amon bavê Yoşiya bû 11 û
Yoşiya bavê Yêxonya û birayên
wî; yên ku di dema sirgûnbûna
Babîlê de welidîne bû.
12 Yêxonya bavê Şaltiyelê ku
piştî sirgûnbûna Babîlê welidiye

bû; Şaltiyel bavê Zerûbabel bû;
13 Zerûbabel bavê Abiyûd bû;
Abiyûd bavê Êlyaqîm bû; Êlya-
qîm bavê Azor bû; 14 Azor bavê
Sadoq bû û Sadoq bavê Axîn bû;
Axîn bavê Êliyûd bû; 15 Êliyûd
bavê Êlazar bû; Êlazar bavê Metan
bû; Metan bavê Aqûp bû; 16 Aqûp
bavê Ûsivê mêrê Meryemê bû;
ji Meryemê jî Îsayê ku bi navê
Mesîh ve têtе binavkirin welidî.
17 Bi vî awayî, nifşeyên ji Birahîm
heta Dawid in, çardeh nifşe ne; ji
Dawid heta sirgûnbûna Babîlê çar-
deh nifşe ne û ji sirgûnbûna Babîlê
heta Mesîh çardeh nifşe ne.

*Bûyîna Îsa Mesîh*

Îşa 7,14; Lûq 1,26-38; 2,1-21

18 Bûyîna Îsa Mesîh jî ûsa bû: Diya
wî Meryem, destgirtiya Ûsiv bû; lê
belê berî ku bi wê re bizewice; hate
fêhm kirin ku ew ji Ruhê Pîroz ve
ducanî bûye. 19 Lê belê destgirtiyê
wê, Ûsiv miroveki salih bû û
nexwest wê rûreş bike û fikirî ku
dizîka wê berde. 20 Lê belê çaxê ku
ew vana difikirî, a vay, milyaketekî
Xudan di xewnê de ji wî re xuya
bû û got: Ya Ûsivê lawê Dawid,
metirse, Meryemê ji xwe re jin
bistîne; ji ber, yê ku di malzaroka
wê de çêbûye ji Ruhê Pîroz e.
21 Ew ê lawekî bîne û divê tu navê
Îsa lê bike; ji ber ku ew ê gelê xwe,
ji gunehên wan xelas bike.
22 Ev hemû çêbûn ku, ew gotina
Xudan bi navgîniya peyxamber bête
cîh ku, dibêje: 23 A vay, dê qîz du-
can be, lawek ji wê bibe û dê navê
wî Îmanûêl[1] deynin; ev jî tê werge-
randin ku: Xwedê bi me re ye.
24 Gava Ûsiv ji xewê rabû, li gor
emrê milyaketê Xudan kir û jina
xwe anî cem xwe. 25 Û ew bi wê
re raneket, heta ku lawê wê bû û
wî navê Îsa li zarok kir.

*Stêrknasên ji rojhilatê tên*

2 Niha, gava Îsa li Beytlehema
Cihûstanê, di rojên qiraletiya
Hêrodês de welidî; a vay, stêrknas
ji rojhilatê hatin Orşelîmê 2 û bi
gotina: Ka Qiralê Cihûdan yê ku
bûyiye, li ku derê ye? Ji ber ku me
li rojhilatê stêrka wî dît û bona ku
em peristinê ji wî re bikin, hatin!
3 Gava ku qiral Hêrodês vêya
bihîst, ew lerizî û hemû Orşelîm jî
pê re. 4 Wî hemû serokên kahînan
û alimên zagonê[2] yên gel civand û
ji wan pirsî: Ka divê Mesîh li ku
derê biwelide? 5 Wan ji wî re got:
Li Beytlehema Cihûstanê, ji ber
ku bi navgîniya peyxamber ûsa
hatiye nivîsîn:
6 Û tu, ya Beytlehema li warê
Cihûstanê! Tu di nav serokên

[1] Îşaya 7:14
[2] Alimên ku kitêbên pîroz didin hev, şîrove dikin û bikar tînin.

Cihûstanê de, tu carî ne yê ku
herî biçûk î; ji ber ku serokê gelê
min yê ku Îsraêlê bajo dê ji te ve
derkeve[1].
7 Wê demê Hêrodês bi dizîka
bangî stêrknasan kir û wextê
xuyabûna stêrkê ji wan tam hîn
bû 8 û wî wan şand Beytlehemê
û ji wan re got: Herin, bi balkêşî
lêkolînê li her tiştên ku di derheqê
zarok de ne bikin; dema ku hûn
wî bibînin, bighînin min ku, ez jî
bêm û ji wî re secde bikim!
9 Gava vana ev tişt ji qiral ve
bihîstin, çûn û a vay, ew stêrka
ku li rojhilatê dîtibûn, di pêşiya
wan de diçû; heta ser wî cîhê
ku zarok lê bûyiye û sekinî.
10 Gava ku wan jî ew stêrk dîtin,
bi dilşayiyeke zehf mezin dilgeş
bûn. 11 Û çûn hundir, zarok tevî
diya wî Meryemê dîtin. Li ber wî
ketin ser rûyê xwe û ji wî re secde
kirin; xizneyên xwe vekirin, zêr,
bixûr û rûnê bêhnxweş bi diyarî
dan wî. 12 Û ji ber ku di xewna
xwe de bona venegerin cem
Hêrodês hatin îkaz kirin, ji rêyek
din ve vegeriyan welatê xwe.

*Reva ber bi Misirê*

13 Gava ku stêrknas ji wir çûn,
milyaketê Xudan di xewnê de ji
Ûsiv re xuya bû û got: Rabe, zarok û diya wî bigire û bireve Misirê û li wir bimîne, heta ku ez ji
te re bêjim, ji ber ku Hêrodês li
zarok digere ku, wî bikuje!
14 Ûsiv jî rabû, zarok û dayika
wî girt û bi şev çû Misirê. 15 Û
heta mirina Hêrodês ew li wir ma.
Vêya ûsa bû ku, ew gotina Xudan bi navgîniya peyxamber hatibû gotin, bête cîh: Min ji Misirê
bangî Lawê xwe kir[2].

*Qirkirina zarokan*

16 Gava Hêrodês dît ku ji aliyê
stêrknasan ve hatiye xapandin,
zehf hêrs bû û li Beytlehemê û di
hundirê hemû sînorên wê de, li
gor dema ku qenc ji stêrknasan ve
hîn bûye, hemû zarokên law, yên
du salî û jê biçûktir in da kuştin.
17 Bi vî awayî ev gotina ku bi navgîniya Yêremya peyxamber ve hatibû gotin, hate cîh: 18 Ji Ramayê
ve dengek hat bihîstin girî û şîna
giran, Rahêl ji bona zarokên xwe
digirî û naxwaze bê xemrevînî kirin, ji ber ku êdî ew tune ne[3]!

*Ji Misirê ve vergerîn*

Lûq 2,39-40

19 Gava Hêrodês mir, milyaketê
Xudan li Misirê di xewnê de ji
Ûsiv re xuya bû û got: 20 Rabe,
zarok û diya wî bigire û here

1 Mîka 5:2
2 Hoşeya 11:1
3 Yêremya 31:15

welatê Îsraêlê; ji ber, yên ku li kuştina zarok digeriyan, mirin! 21 Ûsiv rabû, lawik û diya wî girt û vegeriya welatê Îsraêlê. 22 Lê belê gava wî bihîst ku, Arxêlayo li şuna bavê xwe Hêrodês li ser Cihûstanê bûye qiral; tirsiya ku vegere wir. Û di xewnê de hate îkaz kirin, ew vekişiya herêma Celîlê. 23 Û ew çûn bajarekî ku, ji wê re dibêjin Nisret. Ev ûsa bû ku, ew gotina bi navgîniya peyxamberan hatiye gotin, bête cîh; ya ku dibêje: Dê ji wî re yê Nisretî bibêjin.

*Belavoka Yehyayê vaftîzkar*

Marq 1,1-8; Lûq 3,1-19; Yû 1,6-8; 15-34

3 Di wan rojan de Yehyayê vaftîzkar di çola Cihûstanê de derket holê û dest bi wazdana gotinê kir 2 û got: Tobe bikin[1]; ji ber ku Serweriya Ezmanan[2] nêzîk bûye! 3 Ev e, yê ku Îşaya peyxamber qala wî kiribû; ji bona wî got: Dengekî ji çolê ve bilind dibe: Rêya Xudan amade bikin, cîhê ku derbas bibe serrast bikin[3]! 4 Û kincê ji pirça devê û di piştê de qayîşekî çermî yên Yehya hebûn û xwarina wî kulî û hingivê bejî bû. 5 Wê demê gel ji Orşelîmê û hemûya Cihûstanê û ji hemû aliyên Urdunê ve dihatin cem wî 6 û li gunehên xwe mukir dihatin û di Çemê Urdunê de, ji aliyê Yehya ve dihatin vaftîz kirin. 7 Gava wî dît ku, ji Fêrisî[4] û Sadûqiyan jî gellek hatine, bona ku vaftîz bin, wî ji wan re got: Ya nîjada maran! Ma kî ji we re got ku, hûn ê ji xezaba tê, birevin? 8 Niha, zadê ku liyaqê tobekirinê ye, bînin! 9 Û ûsa di dilê xwe de nefikirin û nebêjin: Birahîm bapîrê me ye. Ji ber ku ez ji we re dibêjim ku: Xwedê dikare ji van keviran zarokan ji Birahîm re biafirîne. 10 A vay, bivir ji niha ve li ser rehê daran e! Her dara ku mêweyê qenc nede, dê bê birîn û bê avêtinî nava agir. 11 Her wekî ez we ji bo tobê bi avê ve vaftîz dikim, lê belê ew ê ku li pey min ve tê, ji min xurttir e; ez ne hêjame ku, çarixên wî rahêjim; ew ê we bi Ruhê Pîroz û bi agir ve vaftîz bike. 12 Melêva wî, di destê wî de ye û ew ê bêndera xwe paqij bike û genimê xwe berhev bike û bavêje embarê; lê belê kayê bi agirkî qet natefe ve bişewitîne.

*Vaftîzbûna Îsa di Çemê Urdinê de*

Marq 1,9-11; Lûq 3,21-22; Yû 1,32-34

13 Wê çaxê Îsa ji Celîlê hat Çemê Urdunê cem Yehya ku, ji aliyê wî ve bê vaftîz kirin. 14 Lê belê Yehya, bi gotina: Ez motajim ku,

1 Ji gunehên xwe vegerin!
2 Qiraletî, serwerî.
3 Îşaya 40:3
4 Di Cihûdan de firqekî olê ye.

ji aliyê te ve bême vaftîz kirin, ma
tu tê cem min? dixwest ku bikeve
pêşiya wî. 15 Lê belê Îsa bersiv da
û ji wî re got: Niha bihêle, ji ber
ku divê em hemûya rastiyê bi vî
awayî bînin cîh! Wê demê Yehya
wî berda.
16 Û Îsa vaftîz bû, hema ji avê
derket û a vay, ezman vebûn û
wî dît ku Ruhê Xwedê mîna ke-
vokekê daket û hate ser wî. 17 Û
a vay, dengekî ji ezmanan ve got:
Lawê minî xoşewîst ev e, ez ji wî
dilxweş im!

*Ceribandina Îsa*

Marq 1,12-13; Lûq 4,1-13

4 Wê gavê Ruh berê Îsa da
çolê ku, ji aliyê Îblîs ve bê
ceribandin. 2 Û piştî ku wî çel
roj û çel şevî rojî girt, birçî bû.
3 Wê gavê yê ku diceribîne[1] nêzîkî
wî bû û jê re got: Ger tu Lawê
Xwedê be, bêje, bila van keviran
bibin nan!
4 Îsa jî lê vegerand û got: Hatiye
nivîsandin ku: Mirov tenê bi nan
najî, lê belê bi her gotina ku ji
devê Xwedê derdikeve dijî[2]!
5 Pişt re Îblîs wî bir bajarê pîroz,
derxist ser qûleya Perestgehê 6 û
ji wî re got: Ger tu Lawê Xwedê
be, de xwe ji wir bavêje xwar; ji
ber ku hatiye nivîsandin: Dê ew ê
ji bo te emir bide milyaketên xwe
û dê ew ê te li ser destê xwe hil-
girin[3] ku, tu lingê xwe li kevirekî
nexe. 7 Îsa ji wî re got: Ev jî hati-
ye nivîsandin: Tuyê Xudan Xwe-
dayê xwe neceribîne[4]!
8 Dîsa Îblîs ew derxist ser çiyayekî
zehf bilind û hemû qiraletiyên dinê
û bedewiya wan nîşanî wî da 9 û
ji wî re got: Ger tu bikevî ser rûyê
xwe û ji min re peristinê bike, ez
ê vana hemûyan bidim te! 10 Wê
gavê Îsa ji wî re got: Vekişe[5], Îblîs!
Ji ber ku hatiye nivîsandin: Ji Xu-
dan, Xwedayê xwe re peristinê
bike û tenê ji wî re qûlitiyê bike[6]!
11 Wê çaxê Îblîs dev ji wî berda
û a vay, milyaket hatin û ji wî re
xizmet kirin.

*Îsa li Celîlê dest bi xizmetê dike*

Marq 1,14-15; Lûq 4,14-15

12 Gava Îsa bihîst ku Yehya hati-
ye girtin, çû aliyê Celîlê. 13 Û wî
Nisretê berda, hat Kefernahumê,
ber behrê, li nav sînorê Zebûlûnê
û Naftaliyê sekinî; 14 da ku, ew
gotina bi navgîniya Îşaya peyxam-
ber ve hatiye gotin bila bête cîh:
15 Welatê Zebûlûnê û welatê
Naftaliyê, li ser rêya ber bi behrê,
wî aliyê Urdunê, Celîla neteweyan!
16 Ew gelê ku di nav tariyê de rûdi-
ne, wan ronahiyek mezin dît û yên

1 Îblîs.
2 (5.Mûsa 8:3)
3 Zebûr 91:11-12
4 (5.Mûsa 6:16)
5 An jî: Ji min dûr biçe!
6 (5.Mûsa 6:13)

ku li welat, di siya mirinê de rû-
dinin, ronahiyek ji wan re derket[1].
17 Wê çaxê Îsa dest bi wazdanê kir
û got: Ji gunehên xwe vegerin, ji ber
ku Serweriya Ezmanan nêzîk bûye!

*Îsa bangî her çar masîgiran dike*

Marq 1,16-20; Lûq 5,1-11; Yû 1,35-51

18 Û gava ku Îsa li ber qeraxa
behra Celîlê digeriya, wî du bira
dîtin; Şîmûnê ku ji wî re digotin
Pêtrûs û Andrêyasê birayê wî; wan
tor diavêtin behrê, ji ber ku ew
masîgir bûn. 19 Û Îsa ji wan re got:
Li pey min werin; ez ê we bikim
nêçîrvanê mirovan! 20 Wan jî
hema torên xwe di cîh de hiştin û li
pey wî çûn. 21 Gava ew ji wê derê
hinekî pêş ve çû, rastî du birayên
din jî hat; Aqûpê Zebedî û Yûhe-
nayê birayê wî; wan tevî bavên
xwe Zebedî, di lotkê de torên xwe
pîne dikirin û wî bangî wan kir.
22 Wan jî hema lotkê û bavê xwe
di cîh de hiştin û li pey wî çûn.

*Îsa hîn dike û nexweşan baş dike*

Lûq 6,17-19

23 Îsa li hemûya Celîlê digeriya, di
kenîştên wan de hîn dikir û Mizgî-
niya Serweriya Ezmanan waz dida;
çi jan û nexweşiyên di nava gel de
hebûn baş dikir. 24 Û navê wî li
her derê Sûriyê belav bû û wan her
cûre mirovên nexweş dianîn cem
wî, yên ku cûr bi cûr di êş û janê de
bûn; yên li cinan ketî û fêdar û kûd
û wî wan baş kir. 25 Û ajaweyên
mezin yên ku ji Celîlê û ji Dêka-
polîsê û ji Orşelîmê û ji Cihûstanê
û ji wî aliyê Urdunê ve dihatin, li
pey wî çûn.

5 Gava Îsa ajaweyê dît, hilkişiya
çiyê û dema rûnişt, şagirtên wî
hatin cem wî. 2 Û wî devê xwe
vekir, hînî wan kir û got:

*Dilgeşiya rasteqîn*

Lûq 6,20-26

3 Xwezî li yên ku di ruh de xizan
in; ji ber ku Serweriya Ezmanan
ya wan e!
4 Xwezî li yên ku di şînê de ne; ji
ber ku ew ê bêne xemrevîn kirin!
5 Xwezî li yên ku nefsbiçûk in; ji
ber ku ew ê erdê bi mêrasî bistînin!
6 Xwezî li yên ku ji rastiyê re bir-
çî û tî bûne; ji ber ku ew ê bêne
têr kirin!
7 Xwezî li yên ku dilsoz in; ji ber
ku dê ji wan re dilsozî bête kirin!
8 Xwezî li yên ku dilê wan paqij
in; ji ber ku ew ê Xwedê bibînin!
9 Xwezî li yên ku aşitîxwaz in; ji
ber ku dê ji wan re lawên Xwedê
bête gotin!
10 Xwezî li yên ku di oxra rastiyê
de zulmê dikişînin; ji ber ku Ser-
weriya Ezmanan ya wan e!
11 Dema mirov di oxra min de
gazinan li we bikin û zulmê li we

[1] An jî: Ji wan re za. Îşaya 9:1-2

bikin û li dijî we bi derewan hemû
cûreyên xerabiyê bibêjin, xwezî li
we! 12 Kêfê bikin û bikêfê bicoşin;
ji ber ku xelata we li ezmanan me-
zin e; ji ber, wan li peyxamberên
ku berî we bûn jî ûsa zulmê kirin.

*Xwê û ronahî*

Marq 9,50; Lûq 14,34-35

13 Xwêya erdê hûn in. Lê belê ger
xwê tama xwe winda bike, dê mi-
rov çawa tama xwê bide wê? Êdî
dê qenciya wê bi tu tiştekî re nêbe;
ji bilî ku bavêjin derve û di bin
lingên mirovan de bête pelixandin.
14 Ronahiya dinê hûn in. Bajarê
ku li serê çiyê ye, nayê veşartin.
15 Mirov çira jî vênaxine û naxe
bin olçekê, lê wê datîne ser ref û
ronahiyê dide hemûyên ku di malê
de ne. 16 Ûsa jî bila ronahiya we
li ber mirovan şewle bide ku, bila
ew jî xebatên we, yên qenc bi-
bînin û ji Bavê we yî li ezmana ye
re şikir bikin.

*Cîhanîna Zagona Ruhanî*

17 Nebêjin qey ez bona ji holê
rakirina zagon an jî peyxamberan
hatime. Ez nehatim ku betal bikim,
lê ez hatim ku wan hemûyan te-
mam bikim! 18 Bi rastî ez ji we re
dibêjim: Berî windabûna erd û ez-
man, herfek an jî niqtukek biçûk ji
zagonê winda nabe, heta ku hemû
bêne cîh. 19 Ji ber vê yekê, kî ji
van emiran yekî herî biçûk xera
bike û bi wî awayî hînî mirovan
bike, dê ji wî kesî re, di Serweriya
Ezmanan de yê herî biçûk bête go-
tin; lê belê kî ku wan bîne cîh û hîn
bike, di Serweriya Ezmanan de dê
ji wî re yê mezin bête gotin. 20 Ez
ji we re dibêjim ku, ger rastiya we
ji rastiya zagonzan û Fêrisiyan ne
zêdetir be, hûn tu carî nikarin tê-
kevin Serweriya Ezmanan!

*Xerabkiriya hêrsê*

Lûq 12,58-59; 1.Yû3,15

21 We bihîstiye ku, ji kalikan re
hatiye gotin: Nekuje! Kî ku biku-
je, dê darazkirinê li xwe heq bike[1].
22 Lê belê ez ji we re dibêjim: Her
kesê ku ji birayê xwe hêrs bibe, dê
bibe mistehaqê darazkirinê. Û her
kesê ku ji birayê xwe re bibêje:
Raka[2]! dê bibe mistehaqê Civata
Netewî. Û her kesê ku bibêje: Eh-
meq! dê bibe mistehaqê agirê do-
jehê[3]. 23 Ji ber vê yekê dema tu xe-
lata xwe di pêşkêşgehê de pêşkêş
dikî, ger li wê derê bête bîra te ku
dilê birê te ji te maye, 24 xelata
xwe li wê derê, li ber pêşkêşgehê
bihêle û berê here, bi birayê xwe
re li hev were û paşê vegere, xe-
lata xwe pêşkêş bike! 25 Dema tu

---

1 (2.Mûsa 20:13 û 5.Mûsa 5:17)
2 Gotinek heqaretê.
3 Cehenemê.

bi dozdarê xwe re hîn di rê de diçî,
destê xwe zû bigre û bi wî re li hev
were ku ew te nede destê dadger
û dadger jî te nede destê pasban[1]
û tuyê bi girtîgehê ve neyê avêtin.
26 Bi rastî ez ji te re dibêjim: Heta
ku tu qurişê xwe yî dawîn nede, tu
nikarî ji wir derkevî!

*Zinê meke*

Met 19,3-9; Marq 10,2-12;
1.Kor 7,10-16.39; Rom 7,2-3

27 We bihîstiye, hatiye gotin ku:
Zinê meke[2]! 28 Lê belê ez ji we re
dibêjim, kî bi dilbijînê li jinikekê bi-
nihêre, wî di dilê xwe de êdî tevî wê
zinê kiriye. 29 Ger çavê te yî rastê
te ber ve sûckirinê bibe, wî derxîne
û ji xwe bavêje! Ji ber ku ji te re
hîn jî çêtir e ku, endamekî te winda
bibe, lê belê hemû bedena te nekeve
dojehê. 30 Û ger destê te yî rastê te
berbi sûckirinê bibe, wî jêke û ba-
vêje! Ji ber ku ji te re hîn jî çêtir e
ku, endamekî te winda bibe, lê belê
hemû bedena te nekeve dojehê.
31 Ev jî hatiye gotin: Kî jina xwe
berde, bila kaxeza jinberdanê
bide wê[3]. 32 Lê belê ez ji we re
dibêjim: Kî ku xeynî sedema zinê
jina xwe berde, ew dibe sedema
zinê kirina wê û kî ku bi jina ber-
dayî re bizewice, zinê dike.

*Qet sond nexwin*

Aqûp 5,12; Rom 12,17-19; Lûq 6,27-36

33 We ev jî bihîstiye ku, ji kalikan
re hatiye gotin: Bi derewan sond
nexwe û tuyê sondên xwe ji Xu-
dan re bide[4].
34 Lê belê ez ji we re dibêjim: Qet
sondê nexwin, ne bi ezmanan, ji
ber ku ew texta Xwedê ye, 35 ne
bi erdê, ji ber ku ew pêlika bin
lingên wî ye, ne jî bi Orşelîmê, ji
ber ku ew bajarê Qiralê mezin e.
36 Û ne jî bi serê xwe sondê bi-
xwe, ji ber ku tu nikarî têlekî serî
sipî bikî, an reş bikî. 37 Lê bila
gotina we: Erê – erê! an jî: Na –
na be! Ji vê zêdetir ji yê xerab e.

*Ji çav re çav, ji diran re diran*

Lûq 6,29-30

38 We bihîstiye ku, hatiye gotin:
Ji çav re çav û ji diran re diran[5]!
39 Lê belê ez ji we re dibêjim: Li
hember yê xerab nesekinin; ger
yek şîrmaqekê li rûyê te yî rastê
xe, yê din jî bide ber. 40 Û ger yek
bixwaze ku bi te re here dadgehê
û kirasê te ji te bistîne, eba xwe jî
ji wî re bihêle. 41 Û ger yek zorê
li te bike, mîlekê[6] te di rê ve bibe,
pê re du mîlan here. 42 Bide yê ku
ji te bixwaze û wecê xwe ji yê ku
ji te deyn bixwaze, venegerîne!

3 Gardiyan, pawan.
2 (2.Mûsa 20:14)
3 (5.Mûsa 24:3)
4 An jî: Sonda xwe li ber Xudan bîne cîh. 3.Mûsa 19:12, 4.Mûsa 30:2 û 5.Mûsa 23:21
5 (2.Mûsa 21:24, 3.Mûsa 24:20 û 5.Mûsa 19:21)
6 Hezar gav.

*Ji neyarên xwe hez bikin*

Lûq 6,27-28; 32-36

43 We bihîstiye ku, hatiye gotin:
Ji cîranê xwe hez bike[1]; ji dijminê
xwe jî bikerihe. 44 Lê belê ez ji
we re dibêjim: Ji neyarên xwe hez
bikin û ji bona yên ku zulmê li we
dikin, dua bikin. 45 Ûsa ku, hûn
bibin zarokên Bavê xwe yî ezma-
nan. Ji ber ku ew roja xwe him li
ser qencan, him jî li ser xeraban re
hiltîne[2] û baranê him li ser rastan
ve him jî li ser çewtan ve dibarî-
ne. 46 Ger hûn tenê ji hezkiriyên
xwe hez bikin, ma dê çi qenciya
wê ji we re bibe? Ma karmendên
bacê[3] jî ûsa nakin? 47 Û ger hûn
tenê silavê bidin birayên xwe, ma
hûn çi tiştî ji yên din zêdetir di-
kin? Ma pûtperest jî ûsa nakin?
48 Ji ber vê yekê, çawa ku Bavê
we yî ezmanan kamil[4] e, hûn jî
ûsa kamil bin!

*Bona xêrkirinê hînkirin*

6 Bala xwe bidin ku, hûn xe-
batên xwe yên qenc li ber ça-
vên mirovan, ji bo nîşan danê me-
kin; ger hûn ûsa bikin, wê çaxê dê
li cem Bavê we yî ezmanan xelata
we tune be.
2 Niha, dema ku tu xêratê bidî, li
pêşiya xwe boriyê nede lêxistinê;
mîna mirovên durûyî, bona ku ji
aliyê mirovan ve pesnahiyên wan
bên dayîn, di kenişt û sûkan de di-
kin. Bi rastî ez ji we re dibêjim:
Wan berdêlên xwe stendine. 3 Lê
belê gava tu xêrê dikî, bila destê
te yî çepê nizanibe ku destê te yî
rastê çi kiriye. 4 Xêra xwe bi di-
zîka bike; bavê te yî di dizîkayiyê
de dibîne jî, dê bide te.

*Bona duakirinê hînkirin*

Lûq 11,1-4

5 Gava hûn dua dikin, mîna durûyan
nebin! Ji ber ew hez dikin, bona
ku mirov wan bibînin, di kenişt û
qadan de disekinin û dua dikin. Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Êdî wan
heqê xwe stendine. 6 Lê belê dema
tu dua dikî, bikeve oda xwe, deriyê
xwe bigre û li ber Bavê xwe yî ku
nayê dîtinê, dua xwe bike. Û Bavê
te ku nayê dîtinê, di veşartinê de
dibîne, dê eşkere bide te.
7 Gava ku hûn dua dikin, mîna
pûtperestan qinikên vala nekin! Ji
ber ew difikirin ku, bi zêde axaf-
tina wan, duayê wan bên bihîstin.
8 Ji ber vê yekê, hûn mîna wan
nebin! Ji ber, berî ku hûn jê bi-
xwazin, Bavê we dizane, çi ji we
re hewce dike.
9 Ji ber vê yekê hûn ûsa dua bikin:
Ya Bavê me yî ezmanan! Bila
navê te bê pîroz kirin. 10 Serwe-

---

1 (5.Mûsa 19:18)
2 Dertîne, radike.
3 Cihûyên ji bona Romayiyên ku darazkirên biyan bûn re bacê (bêşê) didan hev.
4 Bêkêmasî.

riya te bê, mîna li ezmanan, bila li
erdê jî viyana[1] te bibe.
11 Nanê me yî rojane, îroj bide
me. 12 Û deynên me ji me re
bibexşîne, çawa ku em jî ji
deyndarên xwe dibexşînin. 13 Û
me nexe ceribandinê, lê belê me
ji yê xerab xelas bike. Ji ber ku
serwerî, qudret û bilindahî heta
abadînan yên te ne! Amîn.
14 Ji ber ku ger hûn sûcên mirovan
bibexşînin, dê Bavê we yî ezma-
nan jî we bibexşîne. 15 Lê belê ger
hûn sûcên mirovan nebexşînin, dê
Bavê we jî sûcên we nebexşîne.
16 Gava ku hûn rojî digirin, mîna
durûyan rûyê xwe daneliqînin; ji
ber, ew rûyê xwe dadiliqînin ku,
mirov bizanibin, ew bi rojî ne. Bi
rastî ez ji we re dibêjim ku, wan
berdêlên xwe stendine. 17 Lê belê
dema tu rojî digirî, rûn li serê xwe
bide û serçavê xwe bişo; 18 da ku,
tu ne ji mirovan re, lê ji Bavê xwe
yî ku nayê dîtin re bi rojî bête xuya
kirin û Bavê te yî ku di veşartinê
de dibîne, dê eşkere bide te.

*Dewlemendiya ezmanî*

Lûq 12,15-34; 1.Tîm 6,9-10

19 Li rûyê erdê, ji xwe re xezîneyan
necivînin; li vir çirçirk û zingar
tune dike, diz jî qul dikin û didizin.
20 Dêvla vêya, li ezmanan ji xwe
re xezîneyan bicivînin ku, li wir
ne çirçirk dikare tune bike, ne jî
zingar, diz jî nikarin qul bikin û
bidizin! 21 Ji ber ku xezîneya
te li ku be, dê dilê te jî li wir be.
22 Ronahiya bedenê çav e; ger
çavê te qenc be, hemûya bedena
te ronahî dibe. 23 Lê belê ger çavê
te xerab be, dê hemûya bedena te
di tariyê de be. Ger ronahiya di te
de tarî be, ew tarî çi mezin e!

*Dilsoziya Xwedanî*

24 Tu kes nikare ji du efendiyan re
xulamtiyê bike; ji ber ku dê an ji
yekî bikerihe û ji yê din hez bike,
an jî bi yekî re dilsoz bimîne[2] û yê
din biçûk bibîne. Hûn nikarin him
ji Xwedê re û him jî ji Mammon[3]
re xulamtiyê bikin!
25 Ji bo vê yekê ez ji we re dibêjim:
Bona jiyana xwe bi gotina, em ê çi
bixwin, an çi vexwin û bona bede-
na xwe, em ê çi li xwe kin nebêjin
û nekevin xemê! Ma can ji xwa-
rinê, beden jî ji kincan ne bilind-
tir e? 26 Li civîkên ezmanan bi-
nihêrin! Ew ne diçînin, ne didûrin,
ne jî di embaran de dicivînin û
dîsa jî Bavê we yî li ezmanan wan
têr dike. Ma hûn ji wan hîn jî ne
biqîmetir in? 27 Di nava we de, kî
dikare bi xemgîniyê pîvanekê bi
ser qama xwe ve bixe?

[1] Daxwaz, xwestin.
[2] Bête girêdan.
[3] Dewlemendî.

28 Bona kincan çima hûn dikevin
xemê? Sosinên qirê bînin ber çavên
xwe; çi xweşik belav dibin û me-
zin dibin! Ne dişuxulin, ne jî dirê-
sin. 29 Lê belê ez ji we re dibêjim:
Silêman jî di nava hemû rewnaqiya
xwe de mîna vana li xwe nekiribû
û xwe nepêça bû. 30 Lê belê ger
Xwedê gîhayê çolê, ya ku îroj heye
û sibê dê bi firnê ve bête avêtin, ûsa
lê dike, ma qey dê hîn jî zêde kin-
can li we neke, ya bawerî kêmno?
31 Ji ber vê yekê bi gotina: Em ê çi
bixwin? an jî: Em ê çi vexwin? An
jî: Em ê çi li xwe bikin? nekevin
xemê! 32 Kesên pûtperest[1], hemû li
van tiştan digerin. Ji ber, Bavê we
yî ezmanî dizane ku hewcedariya
we ji van tiştan hemûyan re heye.
33 Lê belê hûn pêşiyê li serwerî û
rastiya Xwedê ve bigerin û dê van
tiştan hemûyan ji we re bên dayîn!
34 Ji ber vê yekê, bona sibê neke-
vin xemê; ji ber ku, roja sibê dê
ji bo xwe xeman bikişînî. Derdê
rojê besî wê ye.

*Kesekî din daraz mekin*

Lûq 6,37-38; 6,41-42

7 Daraz mekin ku, hûn neyên
daraz kirin! 2 Ji ber ku hûn bi
kîjan daraziyê daraz bikin, hûn
ê bi wê bên daraz kirin û hûn bi
kîjan pîvanê bipîvin, dê bi wê
pîvanê ji we re jî bê pîvandin. 3 Tu
çima qirşikê di çavê birayê xwe
de dibînî, lê mirdiyaqê di çavê
xwe de seh nakî[2]? 4 An jî dema
mirdiyaq di çavên te de disekine,
tu çawa ji birayê xwe re dibêjî:
Bisekine, ez qirşika di çavê te de
yî derxînim? 5 Ya kesê bi durûyî!
Pêşiyê mirdiyaqê di çavê te de ye
derxîne, wê demê bona tu qirşika
di çavên birayê xwe de derxînî,
tuyê hîn jî qenctir bibînî!
6 Tiştê ku pîroz e nedin kûçikan û
inciyên xwe nevêjin ber berazan
ku, ew wan di bin lingên xwe de
neeciqînin û venegerin û we perçe
nekin.

*Duaya çalak*

Lûq 11,5-13

7 Bixwazin, dê ji we re bê dayîn;
bigerin, hûn ê bibînin; li derî bi-
xin, dê ji we re bête vekirin! 8 Ji
ber ku her kesê bixwaze, dê bigi-
re, yê bigere, dê bibîne û yê li derî
bixe, dê derî ji wî re bête vekirin.
9 Di nava we de kî, dema lawê wî
ji wî nan bixwaze, kevir dide wî?
10 An jî dema masî bixwaze, mar
dide wî? 11 Niha çawa ku hûn xe-
rab in jî, dizanin diyariyên qenc
bidin zarokên xwe, Bavê we yî li
ezmanan, çiqas zêde tiştên qenc
bide yên ku ji wî dixwazin!
12 Niha hûn her çi dixwazin ku
mirov ji we re bikin, hûn jî ji wan

1 Gelên ku xeynî neteweya Îsraêlê.

2 Ferq nakî.

re ûsa bikin! Ji ber ku zagon ew e
û peyxamberan jî.

*Deriyê teng û deriyê fireh*

Lûq 13,23-25

13 Ji deriyê teng ve bikevinê; ji
ber ku deriyê dibe têkçûnê fireh
û rê jî hêsan e û yên ku dikevin
wê, gellek in. 14 Lê belê deriyê
ku dibe jiyanê teng û rê jî dijwar e
û yên ku wê dibînin kêm in.

*Dar û fêkiyê wê*

Met 24,3-13.24; Lûq 6,43-46; K.Şa
20,29

15 Ji peyxamberên derewîn xwe
biparêzin; ew di nava postê mîhan
de nêzîkî we dibin, lê belê di hun-
dir de gurên xwînxwar in! 16 Hûn
ê wan ji fêkiyên wan ve binasin.
Ma mirov ji keleman ve tirî, ji diri-
yan ve hêjîran didin hev? 17 Bi vî
awayî her darê qenc, fêkiyê qenc
dide, lê belê darê riziyayî fêkiyê
xerab dide. 18 Darê qenc nikare fê-
kiyê xerab bide û darê riziyayî jî ni-
kare fêkiyê qenc bide. 19 Her dara
ku fêkiyê qenc nade, tête jêkirin û
avêtinî nav êgir. 20 Bi vî awayî hûn
ê wan ji fêkiyên wan ve binasin.
20 Bi vî awayî hûn ê wan ji dexlên
wan ve binasin.
21 Her kesê ku ji min re dibêje:
Ya Xudan, ya Xudan! Ne yê ke-
tina Serweriya Ezmanan e! Lê
yê ku viyana[1] Bavê minî ezmanî
bike, dê bikevê. 22 Wê rojê, dê
gellekan ji min re bibêjin: Ya Xu-
dan, ya Xudan! Ma me bi navê
te peyxamberî nekirin? Ma me
bi navê te cinan neqewirandin?
Ma me bi navê te gellek karên bi-
qudret nekirin? 23 Û wê demê, ez
ê bi eşkeretî ji wan re bêjim: Min
we qet nas nekir; ji min dûr herin,
kesên bêzagon[2]!

*Kesê ku mala xwe bi zaniyarî ava dike*

Lûq 6,47-49

24 Wê demê, her kesê ku van go-
tinên min dibihîze û tîne cîh, mîna
zilamê aqlê wî li serê wî, yê mala
xwe li ser zinarê ve ava dike ye.
25 Baran bariya û lehî rabûn û
bahoz hat û êrîşî wî xaniyî kirin; lê
belê xanî xera nebû; ji ber ku binge-
ha wê li ser zinarê ve hatibû avêtin.
26 Û heçî kesê ku van gotinên min
dibihîzin û naynin cîh, mîna zilamê
bêaqil, yê xaniyê xwe li ser qûmê
ve avakiriye yî. 27 Baran bariya û
lehî rabûn û bahoz hatin û êrîşî wî
xaniyî kirin; xanî xera bû û him jî
xerabûna wê bi tirsehêz bû.
28 Û wusa bû ku, dema Îsa van
gotinan qedand; gel bi hînkirinên
wî ve gellekî ecêb man. 29 Ji ber
ku wî mîna kesekî rayedar ji wan
re dida hînkirinê û ne mîna alimên
wanî zagonê.

---

[1] Daxwaza.

[2] Gunehkarno.

*Îsa yekî bi cizam pak dike*

Marq 1,40-45; Lûq 5,12-16

8 Dema ew ji çiya ve daket, aja-
weyek mezin li pey wî çûn.
2 Û a vay, yekî bi cizam[1] nêzîkî wî
bû û bi gotina: Ya Xudan, ger tu
bixwazî dikarî min pak bikî, jê re
secde kir. 3 Îsa jî destê xwe dirêj kir
û li wî xist û got: Dixwazim, pak
bibe! Di wê demê de, zilam ji ciza-
ma xwe pak bû. 4 Û Îsa ji wî re got:
Tu carî ji kesekî re nebêje; lê here
û xwe nîşanî kahîn bide û bona ku
şahdeyê bikin, xelata ku Mûsa emir
daye, pêşkêşî[2] wan bike!

*Îsa zilamê Sersedekî baş dike*

Lûq 7,1-10

5 Gava Îsa kete Kefernahûmê, sit-
vanek hate cem wî, li ber geriya
û got: 6 Ya Xudan! Xulamê minî
kûd li malê radikeve, zehf êşê
dikişîne! 7 Îsa ji wî re got: Ez ê
werim û wî baş bikim! 8 Sitvan
bersivê da û got: Ya Xudan! Ez
ne hêja me ku, tu bê mala min; lê
belê tenê gotinekê bêje û dê xu-
lamê min baş bibe! 9 Ji ber ku ez
jî mirovekî bin emr im û di bin
destê min de jî leşker hene û ez ji
yekî re dibêjim: Here! diçe, ji yê
din re dibêjim: Were! tê û ji xu-
lamê xwe re dibêjim: Vî tiştî bike!
ew dike.
10 Û gava Îsa vêya bihîst, şaş ma û
ji yên li paşî xwe ve dihatin re got:
Bi rastî ez ji we re dibêjim: Min di
Îsraêlê de jî baweriyeke ûsa mezin
nedît! 11 Û ez ji we re dibêjim ku:
Gellekan dê ji rojhilatê û ji rojavayê
bên û di Serweriya Ezmanan de tevî
Birahîm û Îshaq û Aqûp dê li sifrê
rûnin; 12 lê belê dê zarokên Ser-
weriyê bêne avêtinî tariya derve; li
wir dê bibe girî û qirçîniya diranan.
13 Û Îsa ji sitvan re got: Here! Bila
li gor baweriya te ji te re bibe. Û wê
demê xizmetkarê wî baş bû.

*Îsa gellek nexweşan baş dike*

Marq 1,29-39; Lûq 4,38-44

14 Û gava Îsa hat mala Pêtrûs, xwe-
siya wî di nava tayê de raketî dît.
15 Îsa bi destê wê girt û tayê jê berda
û ew jî rabû û ji wî re xizmet kir.
16 Gava êvar bû, gellek kesên
cinoyî anîn cem wî; wî bi go-
tinekê ruhên xerab derxist û hemû
nexweşan baş kir. 17 Vêya ûsa bû
ku, ew gotina bi navgîniya Îşaya
peyxamber ve hatiye gotin bête
cîh: Wî nexweşiyên me girtin ser
xwe û êşên me bi xwe kişand[3].

*Pêşhatina banga ezmanî*

Lûq 9,57-62

18 Dema ku Îsa ajaweyên mezin
li dora xwe dît, emir da şagirtan

---

1 Kotîbûyî.
2 (3.Mûsa 13:49 û 14:2-9)
3 Îşaya 53:4

ku herin wî aliyê dinî golê. 19 Wê
wextê alimek zagonê nêzîkî wî bû
û got: Mamoste, tu bi ku derê ve
biçî, ez ê jî li pey te bêm!
20 Û Îsa ji wî re got: Qulên rêviyan
hene û hêlînên teyrên ezmanê hene,
lê belê cîhekî Lawê Mirov nîne ku
ew serê xwe lê bisipêre. 21 Şagirtekî
wî yê din jî ji wî re got: Xudan, des-
tûrê bide min ku, ez berê herim û
bavê xwe defin bikim! 22 Îsa ji wî
re got: Tu li pey min were û bihêle,
bila mirî miriyên xwe defin bikin!

*Îsa bahozê dide sekinandin*

Marq 4,35-41; Lûq 8,22-25; Zeb 89,9

23 Gava Îsa ket lotkekê, şagirtên
wî jî tevî wî siwar bûn. 24 Û a
vay, bahozek mezin di nav golê de
rabû, wusa ku, lotke di nav pêlan
de winda dibû; ew jî di xew de bû.
25 Û şagirt nêzîkî wî bûn, wî hişyar
kirin û gotin: Ya Xudan, me xelas
bike! Em helaq dibin! 26 Û Îsa ji
wan re got: Çima hûn ditirsin, ya
bawerîkêmno? Wê demê rabû, bi
bahoz û golê ve pekiya û bêdengi-
yek mezin çêbû. 27 Û mirovan şaş
man û gotin: Ev yekî çawa ye ku,
ba û gol jî ji wî re îtaet dikin?

*Îsa du kesî cinoyî baş dike*

Marq 5,1-20; Lûq 8,26-39

28 Û dema ku Îsa hate welatê Ger-
darîniyan, ya ku li aliyê hember
bû, du zilamên cinoyî yên ji nav
goristanê derketine pêşwaziyê li
wî kirin. Bona ku ew zehf har bûn,
tu kes nikarîbû ji wê rêya ve der-
bas bibûna. 29 Û a vay, wan kirin
qêrîn û gotin: Ya Lawê Xwedê!
Ma te çi ji me ye, tu ji berî wex-
tê hatî vir ku, lêdanê li me bikî?
30 Keriyekî berazan ya mezin,
a ku ji wan dûrtir diçêriya hebû.
31 Cinan li ber wî geriyan û gotin:
Ger tuyê me derxînî, bihêle em he-
rin, bikevin nava keriyê berazan!
32 Û wî ji wan re got: Herin! Ew
derketin û çûn nav berazan û a vay,
hemûya keriyê berazan ji kendalê,
bi golê ve hatin avêtin û di avê de
xeniqîn. 33 Lê belê şivan reviyan
û çûn bajêr û her tiştî û çi ku ha-
tibû serê cindaran, gotin. 34 Û a
vay, hemû mirovên bajêr derketin
pêşiya Îsa û gava ew dîtin, ji wî
rica kirin ku, bila ji sînorên wan ve
vekişe.

*Îsa miroveki kûd baş dike*

Marq 2,1-12; Lûq 5,17-26

9 Û Îsa li lotkekê siwar bû, der-
basî aliyê din bû û hate bajarê
xwe. 2 Û a vay, yekî kûd di nava
livînan de raketî anîn cem wî. Û
dema Îsa baweriya wan dît, ji yê
kûd re got: Lawo, dilawêr[1] be; gu-
nehên te hatin bexşandin!
3 Û a vay, hinek alimên zagonê di
nav xwe de gotin: Ev mirov kufrê
dike! 4 Û Îsa bi zanîna ramanên

[1] Cesûr, wêrek

wan got: Ma hûn çima di dilê xwe
de tiştê xerab difikirin? 5 Ma go-
tina kîjanê hêsantir e? Gunehên
te hatin bexşandin, an: Rabe û
bimeşe? 6 Lê belê bona ku hûn bi-
zanibin Lawê Mirov rayedar e ku,
li rûyê erdê gunehan bibexşîne; ji
yê kûd re got: Rabe, livînên xwe
hilde û here mala xwe! 7 Û ew jî
rabû û çû mala xwe. 8 Û gava ku
gel vêya dît, tirsiyan û ji Xwedê
re sipasî kirin ku, rayedariya ûsa
daye mirovan.

*Îsa bangî Meta dike*

Marq 2,13-17; Lûq 5,27-32

9 Dema Îsa ji rê ve derbas dibû, yekî
ku navê xwe Meta bû, li cîhê bacê
rûniştî dît û ji wî re got: Li pey min
were! Û ew rabû û li pey wî çû.
10 Û wusa bû ku, dema ew
li malê, li sifrê rûniştibû, a
vay, gellek karmendên bacê û
gunehkar hatin, tevî Îsa û şagirtên
wî rûniştin. 11 Û dema ku
Fêrisiyan ev yek dîtin, ji şagirtên
wî re gotin: Çima mamosteyê we,
tevî memûrên bacê û gunehkaran
dixwe û vedixwe? 12 Lê belê
gava Îsa ev tişt bihîst, ji wan re
got: Hewcedariya tenduristan ji
hekîm re nîne, lê nexweş hewce
ne. 13 Lê belê hûn herin û bi
mana gotina ku: Ez dilovaniyê
dixwazim, ne qurbanê[1]; hîn bibin.
Ji ber ez ne hatime ku, bangî yên
rast bikim, lê hatime ku bangî
gunehkaran bikim.

*Rojî girtin*

Marq 2,18-22; Lûq 5,33-39

14 Wê çaxê şagirtên Yehya hatin
cem wî û gotin: Em û Fêrisî rojî-
yê digirin, ma şagirtên te çima rojî
nagirin? 15 Û Îsa ji wan re got: Qet
dibe, wekî vexwendiyê dawetê
şînê bikin, heta ku zava tevî wan
e? Lê belê rojê bên, zavayê ji wan
veqete û wê çaxê dê rojiyê bigirin.
16 Qet kesek bi cawê nû, kincê
kevin pîne nake; ji ber ku cawê
kincê kevin ve dirûtî dê biqete û
dirîn hîn xerabtir bibe. 17 Ne jî
xemra nû dikin meşkên kevin; ya
na, dê meşk biqelişe, dê xemr bi-
rije û meşk helaq bibin; lê xemra
nû dikin meşkên nû û bi vî awayî
herdu jî têne parastin.

*Keçika serok û pîreka nexweş*

Marq 5,22-43; Lûq 8,41-56

18 Gava wî van tiştan ji wan re
digot, a vay, serokek[2] hat û jê re
secde kir û got: Qîza min ha niha
mir; lê belê tu were û destê xwe
deyne ser wê, dê ew ê bijî!
19 Û Îsa rabû û tevî şagirtên xwe
li pey wî çû. 20 Û di vê navberê
de jinikek nexweş ku ji donzdeh
salan ve xwîn jê diçû, ji paşê ve

*1* Hoşeya 6:6

*2* Serokekê kenîştê.

hat û xwe li dawa kincê Îsa ve
xist. 21 Ji ber ku wê di dilê xwe
de digot: Ger ez tenê destê xwe di
kincê wî de bidim, ez ê xelas bim!
22 Îsa jî vegeriya, ew dît û got:
Dilawêr be, keça min! Baweriya
te, te baş kir! Û jinik ji wê saetê
ve baş bû.
23 Gava Îsa hate mala serok,
koma mirovan ya bideng û bilûr-
vanên ku, li ser miriyê bilûrê di-
xistin, dît 24 û ji wan re got: Der-
kevin! Ji ber ku qîzik nemiriye, lê
radikeve. Û ew zehf pê keniyan.
25 Lê belê gava gel bi derve hatin
derxistin, ew çû hundir û bi destê
wê girt û qîzik rabû ser xwe. 26 Û
agahiya vê bûyerê li hemûyên wî
welatî belav bû.

*Îsa du mirovên kor û yekî lal baş dike*

Marq 8,22-26; Met 12,22-24

27 Û gava Îsa ji wir derket çû,
du mirovên kor dan pey wî, kirin
qêrîn û gotin: Lawê Dawid, ji me
re dilovaniyê bike!
28 Gava ku Îsa hate mal, kor ha-
tin cem wî û Îsa ji wan pirs kir:
Ma Hûn bawer dikin ku ez dika-
rim vêya bikim? Koran jê re go-
tin: Erê, ya Xudan! 29 Wê çaxê
Îsa, bi gotina: Bila ji we re, li gor
baweriya we bibe! destê xwe di
çavên wan de da. 30 Wê demê
çavên wan vebûn. Û Îsa temiyê li
wan kir û got: Hay ji xwe hebin,
bila tu kes bi vê yekê nizanibin!
31 Lê belê ew derketin û li hemûya
welêt vêya belav kirin.
32 Dema ku ew derketin çûn, a
vay, cindarekî lal anîn cem Îsa.
33 Gava ku cin hat derxistin, zi-
lamê lal axifî, gel ecêb ma û gotin:
Li Îsraêlê tiştekî ûsa qet nehatiye
dîtin! 34 Lê belê Fêrisiyan digotin:
Ew bi serokê cinan, cinan derdixe!

*Zad zêde ye, xebatkar kêm in*

35 Û Îsa li hemû gund û ba-
jaran geriya û di kenîştên wan
de hîn dikir û Mizgîniya Ser-
weriyê waz dida û di nav gel de
hemû cûre nexweşiyan baş dikir.
36 Lê belê gava Îsa ajaweyan dît,
dilê wî bi wan şewitî, ji ber ku
ew mîna mîhên bê şivan, bi xem
û belavbûyî bûn. 37 Wê çaxê Îsa
ji şagirtên xwe re got: Zad zêde
ye, lê belê xebatkar kêm in. 38 Ji
ber vê yekê lavan ji Xudanê zadê
bikin ku, bila bona zada xwe xe-
batkaran bişîne!

*Bijartina donzdeh Şagirtan*

Marq 3,13-19; 6,7-11;
Lûq 6,12-16; 9,1-5

10 Îsa her donzdeh şagirtên
xwe bangî cem xwe kir û
rayedarî da wan ku, ruhên xerab
derxin, hemû êş û nexweşiyan
jî baş bikin. 2 Navê her donz-
deh Şandiyan vana ne: Yê pêşîn
Şîmûn ku, ji wî re Pêtrûs gotin û
birayê wî Andrêyas, Aqûpê Zebe-

dî û birayê wî Yûhena, 3 Fîlîpûs
û Bartolomeyo, Tûmas û memûrê
bacê Meta, Aqûpê lawê Alfay û
Tadeyos, 4 Şîmûnê Welatparêz
û Cihûdayê Îsxeryotî, ew ê ku
bêbextî ji Îsa re kir.
5 Îsa ev her Donzdehan şand,
emir da wan û got: Neçin rêyên
neteweyan û nekevin tu bajarên
Samîriyan; 6 lê belê hîn jî zêde
herin nav mîhên mala Îsraêlê yên
winda bûyîne. 7 Gava hûn herin,
waz bidin û bêjin: Serweriya Ez-
manan nêzîk bûye! 8 Nexweşan
baş bikin, miriyan bivejînin, ci-
zamiyan paqij bikin û cinan der-
xînin! We bêberdêl girtin û bêber-
dêl bidin! 9 Ne zêr, ne zîv, ne jî
sifir di nava pişta xwe de veşêrin;
10 ne tûrik ji bona rê, ne du qat
kinc, ne çarix, ne jî ço bigirin; ji
ber ku xebatkar liyaqî xwarina
xwe ye.
11 Dema hûn têkevin bajarekî an
jî gundekî, malekî liyaq bibînin û
li wir bimînin, heta ku hûn ji wir
diçin. 12 Gava hûn têkevin malê,
silavê lê bikin. 13 Û ger ew mal
liyaq be, bila aştiya we were ser
wê, lê belê ger ne liyaq be, bila
aştiya we, li we vegere. 14 Û kî
ku we qebûl neke û guhdariya go-
tinên we neke, gava ku hûn ji wê
malê, an jî ji wî bajarî derkevin,
toza lingê xwe dawişînin! 15 Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Di roja
daraziyê de dê rewşa welatê So-
dom û Gomorayê ji ya wî bajarî
çêtir bibe!
16 A vay, ez we mîna mîhan
dişînim nav guran; mîna maran
baqil bin û mîna kevokan pak bin!

*Xemê nekişînin*

Marq 13,9-13; Lûq 21,12-17

17 Lê belê xwe ji mirovan ve
biparêzin! Ji ber ku dê ew we bidin
destê sazûmanan û di kenîştên xwe
de dê we bidin ber qamçiyan. 18 Û
ji bona min dê we bibin ber waliyan
û qiralan ku, ji wan û netewan re
hûn şahdeyiyê bikin. 19 Lê belê
gava wan hûn dan dest, bona ku ka
em ê çi, an jî çawa bibêjin, xemê
nekişînin; ji ber ku di wê demê
de, ka hûn çi biaxifin dê ji we re
bête dayîn. 20 Ji ber, yê ku diaxife
ne hûn in; lê belê yê ku di we de
diaxife, Ruhê Bavê we ye.
21 Û dê bira birayê xwe û bav dê
zarokê xwe bidin destê kuştinê
û dê zarok li dijî dayik û bavên
xwe rabin û wan bikujin. 22 Û
bona navê min her kes dê ji we
bikerihin. Lê belê kî ku heta da-
wiyê sebir bike, dê ew xelas bibe.
23 Lê belê dema li vî bajarî tah-
dê li we bikin, birevin yê din. Ji
ber ku bi rastî ez ji we re dibêjim:
Heta Lawê Mirov were, hûn ê
gera bajarên Îsraêlê neqedînin.
24 Şagirt ji mamosteyê xwe ve ne
mezintir e û ne jî kole ji efendi-
yê xwe. 25 Hewce dike ku şagirt

mîna mamosteyê xwe be û kole jî
mîna efendiyê xwe be. Ger wan
navê Beelzebûl[1] ji xwediyê malê
kiribin, dê çiqas bi zêdeyî ji gelê
mala wî re bêjin!

*Ji kî bitirsin*

Lûq 12,2-7

26 Ji ber vê yekê tu carî ji wan
netirsin, ji ber qet tiştekî sergirtî
tune ku neyê vekirin û ne jî tiştekî
veşartî heye ku neyê zanîn. 27 Çi
tiştên ku ez di tariyê de ji we re
dibêjim, wan di nav ronahiyê de
bibêjin û yên ku di guhên we de
hatine gotin, li ser xaniyan ve gazî
bikin! 28 Û ji yên ku dikarin be-
denê bikujin, lê belê nikarin can
bikujin metirsin; lê ji yê ku dikare
can jî bedenê jî di dojehê de tune
bike bitirsin! 29 Du civîk bi pe-
rekî têne firotin, ne ûsa ye? Lê
belê yek jî ji wan bêyî destûr dana
Bavê we nakeve erdê. 30 Û heta
hemûyên porên serê we jî hatine
jimartin. 31 Ji ber vê yekê netir-
sin! Ji ber ku hûn ji gellek civîkan
hîn jî birûmettir in.

*Şûr û aşitî*

Met 16,24-25; Lûq 12,8-9,51-52; 14,21-27

32 Niha, di vê rewşê de her kî ku
min li ber mirovan qebûl bike, ez
ê jî wî li ber Bavê xwe yî ezmanan
ve qebûl bikim. 33 Lê belê her kî
ku li ber mirovan min înkar bike,
ez ê jî wî li ber Bavê xwe yî ezma-
nan înkar bikim.
34 Nebêjin ku qey ez bona aşitî
anînê hatibim dinê. Ez ne bona
anîna aşitiyê, lê belê bona şûr bî-
nim hatime! 35 Ji ber ku ez hatim,
law ji bavê û qîzê ji dayikê û bûkê
jî ji xwesiyê veqetînim. 36 Û dê
neyarên mirovan ji nav maliyên
wî bi xwe bin.
37 Kî ku bav û diya xwe ji min
zahftir hez bike, ne hêjayî min e
û kî ku ji lawê xwe an jî qîza xwe
ji min zahftir hez bike, ne hêjayî
min e. 38 Û kî ku xaça xwe hilne-
de û li pey min neyê, ew ne hêjayî
min e. 39 Kî ku canê xwe bibîne,
dê wê winda bike û kî ku canê
xwe di oxra min de winda bike,
dê wê bibîne!

*Yê ku we qebûl dike, min qebûl dike*

Marq 9,41; Met 25,34-40

40 Yê ku we qebûl dike, min qe-
bûl dike û yê ku min qebûl dike,
yê ku min şandiye, qebûl dike.
41 Yê ku peyxamberekî ji ber ku
peyxamber e qebûl bike, dê xelata
peyxamberî bistîne û yê ku miro-
vekî salih ji ber ku salih e qebûl
bike, dê xelata salihtiyê bistîne.
42 Û her kî, ji yekî ji wan biçûkan
re, ji ber ku şagirt e, tenê tasekî
ava sar bide vexwarin, bi rastî ez
ji we re dibêjim ku, tu car ew kes
xelata xwe winda nake!

[1] Serokê cinan.

*Pirsa Yehyayê vaftîzkar*
Lûq 7,18-35

11 Û wusa bû ku, gava Îsa emir
dayîna donzdeh şagirtên xwe
qedand, bona di bajarên wan de
bide hînkirinê û waz bide ji wir çû.
2 Lê belê gava ku Yehya di
hepsê de ji şuxulên Mesîh bihîst,
şagirtên xwe şand cem wî 3 û bi
navgîniya wan ji wî pirsî: Ma tu
yî, ew ê ku divê bihata, ya na em
li hêviya yekî din bin? 4 Û Îsa
bersiv da û ji wan re got: Herin,
çi ku hûn dibînin û dibihîzin, ji
Yehya re bibêjin: 5 Kor dibînin,
kûd digerin, cizamî paqij dibin
û kerr dibihîzin, mirî divejin û ji
belengazan re Mizgînî tête waz
dan. 6 Û xwezî li wî kesî ku, di
min de tilpekî nabe!
7 Û wexta ku ew çûn, Îsa dest pê-
kir, di derheqê Yehya de ji gel re
got: Ma hûn derketin çolê ku, çi
bibînin? Qamîşekî ku ji bayê di-
hejiya? 8 Ma hûn derketin ku, çi
bibînin? Mirovekî ku kincê nerm
li xwe kirî? A vay, yên ku kincê
nerm li xwe dikin, di qesrên qi-
ralan de ne! 9 Lê belê hûn derke-
tin ku, çi bibînin? Peyxamberekî?
Belê, ez ji we re dibêjim, ji pey-
xamberekî jî seretatir e! 10 Ji ber
ku ev ew e, yê ku bo wî ûsa hatiye
nivîsîn:
A vay, ez şandiyê xwe li pêşiya te
bişînim, dê ew ê rêya te di pêşiya
te de amade bike[1].
11 Bi rastî ez ji we re dibêjim: Ji
nav yên ku ji pîrekan welidîne,
yekî ji Yehyayê vaftîzkar sere-
tatir derneketiye; lê belê di nava
Serweriya Ezmanan de yê herî
biçûk jî ji wî seretatir e. 12 Ji ro-
jên Yehyayê vaftîzkar heta niha
tahde li Serweriya Ezmanan tê
kirin û kesên ku dijwar in, wê bi
dest ve dixin. 13 Ji ber ku hemû
peyxamberan û zagonê heta dema
Yehya peyxambertiyê kirin. 14 Û
ger hûn bixwazin wî qebûl bikin,
Êlyasê ku dê bê ew e. 15 Guhên
kê hene, bila bibihîze!
16 Lê belê ez vê nifşeyê mîna çi
bikim? Ew mîna zarokan e ku, di
qadên sûkê de rûdinin, bangî he-
valên xwe dikin 17 û dibêjin: Me
ji we re bîlûr kutan, lê belê hûn
nelîstin; me lorîn kirin û hûn li ber
xwe neketin!
18 Ji ber ku Yehya hat, ne di-
xwar, ne vedixwar û ew dibêjin:
Cin di wî de hene! 19 Lawê Mi-
rov hat, dixwe û vedixwe, îcar
dibêjin: A vay, ew pirrxwar û
araqvexwur, hevalê karmendên
bacê û gunehkaran e! Û zaniyarî
bi karên xwe ve hate tesdîq ki-
rin[2].

*1* Maleyaxî 3:1

*1* An jî: Û zaniyarî ji aliyê zarokên xwe ve hate tesdîq kirin.

*Bajarên bêbawerî*
Lûq 10,13-16

20 Wê gavê Îsa dest pê kir bi ba-
jarên gellek karên xwe yî xwurt
di wan de çêkirîbû re xeyîdî;
ji ber ku wan tobe nekiribûn.
21 Wey li te, ya Xorazîn! Wey li
te, ya Beytsayda! Ji ber ku ger ev
kerametên ku li nav we çêbûn, di
Sûr û Saydayê de çêbibûna, wanê
ji zû ve cilikan li xwe bikirana û
di nava xweliyê de tobe bikirana.
22 Lê belê ez ji we re dibêjim: Dê
di roja daraziyê de ji we zêdetir,
ji Sûr û Saydayê re hêsanî bibe!
23 Û tu, ya Kefernahûm! Ma
tuyê hetanî ezmanan bête bilind
kirin? Na, tuyê hetanî dojehê biçe
xwarê! Ji ber, ger ew kerametên
ku di nav te de çêbûn, di Sodomê
de çêbibûna, ew ê heta roja îroj
bimaya. 24 Lê belê ez ji we re
dibêjim: Dê di roja daraziyê de ji
te zêdetir, ji warê Sodomê re hê-
sanî bibe!

*Mizgînî ji bo kesên bargiran*
Lûq 10,21-22

25 Wê çaxê Îsa dest pê kir û got:
Bila şikirî ji te re bibe, ya Bav,
Xudanê erd û ezman. Ji ber ku
te vana ji yên zana û baqil veşart
û ji zarokên biçûk re eşkere kir!
26 Belê, Bavo; ji ber ku ji xwesti-
na te re ya xweşik ev bû!
27 Her tişt ji aliyê Bavê min ve ji
min re hatine dayîn û xeynî Bav
tu kes bi Law nizane û xeynî Law
û yên ku Law bixwaze Bav jê re
bide nasîn tu kes jî bi Bav nizane.
28 Ya hemû kesên westiyayî û
bargiran, werin cem min û ez ê
rehetiyê bidim we! 29 Nîrê min
hilgirin ser xwe û ji min hîn bibin,
ji ber ku ez xûnerm[1] û ji dil nefs-
biçûk im û hûn ê ji canên xwe re
rehetiyê bibînin! 30 Ji ber ku nîrê
min hêsan û barê min sivik e.

*Pirsa roja Sebtê*
Marq 2,23-28; Lûq 6,1-5

12 Wê wextê Îsa, roja Sebtê
di nav dexlan de derbas bû;
şagirtên wî birçî bûn û dest pê ki-
rin, similên geniman çinîn û xwa-
rin. 2 Lê belê gava ku Fêrisiyan
ev yek dîtin, ji wî re gotin: A vay,
şagirtên te tiştê ku roja Sebtê kiri-
na wan ne caiz e dikin!
3 Îsa jî ji wan re got: Ma we ne-
xwendiye ku Dawid çi kir, gava
ew û yên ku tevî wî birçî bûn?
4 Çawa ketiye mala Xwedê û
nanên aramiyê, yên ku xwarina
wê ne ji wî re ne jî ji yên ku bi wî
re be, lê tenê ji kahînan re caiz e
xwariye[2]? 5 An jî ma we di zagonê
de nexwendiye ku, kahîn rojên
Sebtê di Perestgehê de Sebtê betal
dikin û dîsa jî bêsûc in? 6 Lê belê

[1] Rûnerm.

[2] (1.Samûyêl 21:6)

ez ji we re dibêjim: Yê ku ji Perest-
gehê herî seretetir e, li vir e! 7 Lê
belê gava we bizanîbûna, mana vê
gotinê çî ye ku, dibêje: Ez dilova-
niyê dixwazim, ne ku qurbanê[1];
wê çaxê we yên bêsûc mehkûm
nekirana. 8 Ji ber ku Lawê Mirov,
Xudanê roja Sebtê ye jî.

*Qaîdeya ku Îsa bijart û da bihîstin*

Marq 3,1-6; Lûq 6,6-11

9 Û Îsa ji wir rabû, hate kenişta
wan. 10 Û a vay, mirovek li wir
hebû ku, destê wî hişk[2] bû. Ji bo
bikaribin ku Îsa sûcdar bikin, wan
jê pirsîn û gotin: Ma roja Sebtê
şîfa dayîn caiz e?
11 Û Îsa ji wan re got: Ji we kî
heye ku, mîheke wî hebe û roja
Sebtê bikeve çalê, dê bi wê negire
û dernexe? 12 Lê belê mirov çiqas
ji mîhê hêjatir e! Ji ber vê yekê roja
Sebtê qencî kirin caiz e. 13 Dawiyê
Îsa ji wî mirovî re got: Destê xwe
dirêj bike! Wî jî destê xwe dirêj kir
û destê wî yî seqet, mîna destê din
baş bû. 14 Lê belê Fêrisî derketin
derve, bi hev re şêwirîn ku, ka dê
ew ê çawa Îsa bidin kuştin.

*Xulamê Xwedê*

Marq 3,7-12; Lûq 6,17-19

15 Û bona ku Îsa ev zanîbû, ji wê
derê çû û gellek kes li pey wî çûn
û wî hemûyên wan qenc kir. 16 Û
bona ku kîbûna wî eşkere mekin,
wî emir li wan kir; 17 da ku, go-
tina bi navgîniya Îşaya peyxamber
ve hatiye gotin bête cîh: 18 A vay,
qûlê min, yê ku min bijartiye û
delalê min, yê ku canê min jê razî
ye! Ez ê Ruhê xwe deynim ser
wî û ew ê ji neteweyan re dara-
ziyê îlan bike. 19 Ew ê pev neçe[3]
û neqîre û dê tu kes dengê wî li
qadan nebihîze. 20 Ew ê qamîşê
perçîqîn hûr neke û fitîla vêketiye
jî netefîne, heta ku dadmendiyê
bigihîne serfîraziyê. 21 Û dê gel
bi navê wî ve hêvîdar bin[4].

*Îsa bi Ruhê Xwedê cinan derdixîne*

Marq 3,20-30; Lûq 11,14-23; 12,10;
Îşa 42,7

22 Wê wextê yekî cinoyî, kor û
lal anîn cem Îsa û wî ew baş kir,
ûsa ku, wî him dît û him jî axifî.
23 Û hemûyên gel ecêb man û go-
tin: Ma Lawê Dawid ev e?
24 Lê belê gava Fêrisiyan bihîstin,
gotin: Ew tenê bi quweta Beelzebûl,
yê şahê cinan, cinan derdixîne!
25 Û Îsa bi zanîna ramanên wan,
ji wan re got: Her qiraletiya ku di
tê de cudayî hebe, dê bibe çolis-
tan û her bajar an jî mala ku di tê
de cudayî hebe, namîne. 26 Û ger
Îblîs Îblîs derdixîne, ew di nav

---

1 Hoşeya 6:6
2 Seqet.
3 An jî: Mijûl nebe.
4 Îşaya 42:1-4

xwe de bêtifaq bûye, êdî qiraleti-
ya wî dê çawa bimîne? 27 Û ger
ez bi navgîniya Beelzebûl cinan
derdixînim, ma lawên we bi nav-
gîniya kî ve derdixînin? Ji ber vê
yekê dê ew ê bibin darazkirên we.
28 Lê belê dema ku ez bi Ruhê
Xwedê cinan derdixînim, Serwe-
riya Xwedê gihîştiye we! 29 An jî
zilamek çawa dikare bikeve mala
yê xurt û malên wî bişelîne? Ger
pêşiyê yê xurt girêde; wê çaxê
dê mala wî talan bike. 30 Kî ne
tevî min e, li dijî min e û ew ê
ku tevî min nacivîne, belav dike!
31 Ji bo vê yekê ez ji we re
dibêjim: Hemû guneh û kufur dê ji
mirovan re bête bexşandin, lê belê
li hember Ruh kufur kirin, nayê
bexşandin. 32 Û kî ku gotinekê li
dijî Lawê Mirov bibêje, dê ji wî re
bête bexşandin, lê belê kî ku li dijî
Ruhê Pîroz bibêje, ji wî re nayê
bexşandin, ne di vê demê de û ne
jî di demên dê werin de.

*Dar û mêwên wê*

Met 7,15-23; Lûq 6,43-45; Rom 3,9-20

33 Divê an hûn ê darê qenc bikin û
mêwên wê jî qenc bibin, an jî hûn
ê darê xerab bikin û mêwên wê jî
xerab bibin! Ji ber ku her darek
ji mêwên xwe tê nas kirin. 34 Ya
nîjada margîskan! Ma hûn çawa
dikarin dema hûn xerab bin, go-
tinên qenc bibêjin? Ji ber ku dev
ji tijî bûna dil ve dibêjî. 35 Mirovê
baş, qenciyê ji xizna dilê xwe yê
qenc dertîne û mirovê xerab jî ji
xizna dilê xwe yê xerab, xerabiyê
dertîne. 36 Û ez ji we re dibêjim:
Roja daraziyê mirov dê bona her
gotineke vala ku diaxifin, deyndar
bibin. 37 Ji ber ku tuyê bi gotinên
xwe bêsûc bibî û bi gotinên xwe
sûcdar bête derxistin!

*Nîşana Yûnis peyxamber*

Lûq 11,29-32

38 Wê gavê hinekên ji alimên
zagonê û Fêrisiyan ji wî re go-
tin: Mamoste, em dixwazin ku,
nîşanekê ji te bibînin! 39 Îsa jî
bersiv da û ji wan re got: Nîjada
xerab û zinêkir nîşanekê dixwa-
zin! Lê belê jê re nîşaneke din
nayê dayîn, xeynî nîşana Yûnis
peyxamber. 40 Çawa ku Yûnis sê
roj û sê şev di zikê masiyê gir de
bû, Lawê Mirov jî ûsa dê sê roj û
sê şev di nava dilê erdê de bimîne.
41 Roja daraziyê, dê gelê Neyno-
wa tevî vê nifşa rabin û wî sûcdar
bikin; ji ber ku wan bi waza Yûnis
tobe kirin û a vay, yekî ji Yûnis
hîn jî mezintir li vira ye! 42 Roja
daraziyê qiralîça başûrê[1] dê tevî
vê nîjadê rabe û wî sûcdar derxî-
ne; ji ber ku ew ji aliyekî dinê ve
hat ku, zanebûna Silêman bibihî-
ze û a vay, yekî ji Silêman hîn jî
mezintir li vira ye!

[1] Qiralîça Şebayê, ya ku hatibû ziyareta Silêman.

*Gava ku ruhê xerab dîsa vedigere*
Lûq 11,24-26

43 Lê belê gava ku ruhê xerab ji mi-
rov derdikeve, ji bo rehetiyê bibîne
li cîhê bê av digere, lê belê nabîne.
44 Wê wextê ew dibêje: Ez vege-
rim mala xwe, ji cîhê ku derketim.
Û gava ew tê, mal vala, paqijkirî û
xemilandî ye. 45 Wê wextê ew diçe
û heft ruhên ji xwe xerabtir digire
cem xwe û dikevin wê derê û rû-
dinin û dawiya rewşa wî mirovî ji
dema pêşiyê xerabtir dibe. Dê ji vê
nîjada xerab re jî eynî wusa bibe!

*Dê û birayên Îsa*
Marq 3,31-35; Lûq 8,19-21

46 Îsa hîn ji gel re diaxifî, a vay, diya
wî û birayên wî li derve sekinîbûn
û dixwestin ku bi wî re biaxifin.
47 Û yekî ji Îsa re got: A vay, diya
te û birayên te li derve sekinîne,
dixwazin bi te re biaxifin! 48 Lê belê
Îsa bersiva yê ku jê re axifî da û got:
Ma kî ye diya min û kî ne birayên
min? 49 Û destê xwe dirêjî şagirtên
xwe kir û got: A vay, diya min û bi-
rayên min! 50 Ji ber ku, her kî viyana[1]
Bavê minî ezmanan bike, birayê
min û xwuşka min û diya min ew e!

*Wekoka cotkar û tovê*
Marq 4,3-9; Lûq 8,4-8

13 Wê rojê Îsa ji malê ve der-
ket û li qeraxa golê rûnişt.
2 Û ajaweyek ewqas mezin li
dora wî civiya bûn ku, ew bi xwe
kete lotkê û rûnişt û hemûya aja-
weyê li qeraxê sekinîbûn. 3 Û Îsa
bi wekokan ji wan re gellek tişt
axifî û got: A vay, cotkar rabû ku,
tovê biçîne. 4 Û gava ku wî çand,
hinek ji wan ketin devê rê û teyr
hatin û ew xwarin 5 û hinekên
din ketin ser cîhê kevirî, li wir ax
zêde tunebû û zû hêşîn bûn, ji ber
ku kûriya axê tunebû. 6 Lê belê
gava roj derket, ew şewitîn; ji
ber ku rehê wan tunebû hişk bûn.
7 Û hinekên din jî ketin nava stiri-
yan û stirî rabûn û ew xeniqandin.
8 Û hinekên din jî ketin nava erdê
qenc û hinekan bi sed, hinekan bi
şêst û hinekan jî sî qat ber dan.
9 Yê ku guhên wî hebe, bila bi-
bihîze!

*Îsa çima bi wekokan ve dibêje?*
Marq 4,10-12; Lûq 8,9,10; Rom 11,7-10

10 Û şagirt hatin û ji Îsa re gotin:
Ma tu çima ji wan re bi wekokan
dibêjî? 11 Û wî bersiv da û got:
Zanîna rêzên di derheqê Serwe-
riya Ezmanan de ji we re hatiye
dayîn, lê belê ji wan re nehatiye
dayîn. 12 Ji ber, yê kê ku hebe, ji
wî re bête dayîn û zêde be û yê
kê ku tunebe, çiqasî wî hebe jî, dê
ji wî bête stendin. 13 Ez ji ber vê
yekê bi wekokan ji wan re dibêjim
ku, ew dibînin jî, lê nabînin û di-
bihîzin jî, lê nabihîzin û fêhm na-

1 Daxwaza.

kin. 14 Û li ser wan peyxamberti-
ya Îşaya tê cîh ku dibêje:
Hûn ê bi guhan bibihîzin û fêhm
nekin û hûn ê bi çavan bibînin û tu
car hilnebijêrin! 15 Ji ber ku dilê
vî netewî stûr bûye û bi guhên
xwe giran dibihîzin û çavên xwe
jî digirin ku, nebe bi çavên xwe
bibînin û bi guhên xwe bibihîzin
û cardin jî vegerin ku ez wan baş
bikim[1].
16 Lê belê xwezî li çavên we ku,
dibînin û guhên we ku, dibihîzin!
17 Ji ber ku bi rastî ez ji we re
dibêjim: Gellek peyxamber û mi-
rovên salih dixwestin van tiştên
ku hûn dibînin bibînin û nedîtin
û tiştên ku hûn dibihîzin, xwestin
ku bibihîzin û nebihîstin.

*Wekoka Cotkar*

Marq 4,13-20; Lûq 8,11-15

18 Ka hûn wekoka cotkar guhdarî
bikin: 19 Her kesê ku gotina Ser-
weriya Ezmanan dibihîze û fêhm
nake, yê xerab tê û yê ku di dilê
wî de hatiye çandin hildikişîne.
Vêya tova ya ku di devê rê de ha-
tiye çandin e. 20 Yê li cîhê kevirî
hatiye çandin jî ew e ku, gava go-
tinê dibihîze, zû bi eşq wê qebûl
dike; 21 lê belê reha wî tuneye, lê
ji bo demekê ye û gava bona go-
tinê[2] tengasiyê an jî zulmê dibîne,
ew hema tilpekî dibe. 22 Û yê di
nava stiriyan de hatiye çandin jî
ew e ku, gotinê dibihîze û xemên
vê dinyayê û dewlemendiya derew
gotinê dixeniqînin û ew bê zad
dimîne. 23 Yê ku di nav erdê qenc
de hatiye çandin jî ew e ku, gotinê
dibihîze, fêhm dike û dexlê dide,
hinek sed, hinek şêst û hinek jî sî.

*Wekoka genim û zîwanê*

24 Îsa wekokekî din da û ji wan
re got: Serweriya Ezmanan mîna
mirovekî ye ku, di nav zeviya
xwe de tovê qenc çand. 25 Lê
belê gava her kes di xew de çûn,
dijminê wî hat û di nav genim
de zîwan çand û çû. 26 Û gava
genim gihîşt û ber da, zîwanê jî
xuya kir. 27 Û xizmetkarên xwe-
diyê malê hatin û ji wî re gotin:
Efendî, ma te di nav zeviya xwe
de tovê qenc neçandiye? Wê
çaxê ev zîwan ji ku hat? 28 Û wî
ji wan re got: Neyarekî vêya kiri-
ye! Xizmetkaran jî ji wî re gotin:
Wê çaxê, gelo tu dixwazî ku em
herin wan berhev bikin? 29 Lê
belê wî got: Na! Nebe ku gava
hûn zîwanê rakin, genim jî pê re
derxînin. 30 Bihêlîn ku, herdu
jî bi hev re mezin bin, heta roja
çinandinê û roja çinandinê ez ê ji
daskêşan[3] re bibêjim: Bila pêşiyê

[1] An jî: Şîfê bidim wan. Îşaya 6:9-10
[2] Ji bo gotina Xwedê.
[3] Paleyan.

zîwanê biçinin, gurz û gurz girê-
din ji bona şewatê, lê belê genim
bikine embara min!

*Wekoka xerdalê û hevîrtirşê*

Marq 4,30-32; Lûq 13,18-21

31 Îsa wekokekê din danî ber wan
û got: Serweriya Ezmanan mîna
hebekî xerdelê ye, ya ku zilamekî
wê girt û di zeviya xwe de çand.
32 Ew heba ku ji hemû tovan ve
biçûktir e, lê belê gava mezin dibe,
ji sewzeyan mezintir e û ew dibe
dar; ûsa ku, teyrên ezmanan tên û
xwe li ser guliyên wê datînin.
33 Îsa wekokekê din ji wan re got:
Serweriya Ezmanan mîna havêna
hevîr e, pîrekekê vêya rahişt û di
nav sê olçek ard de, heta ku hemû
tirş bû wê veşart.
34 Îsa hemûyên van tiştan bi
wekokan ji gel re got û wî bêyî
wekok qet tiştekî ji wan re nedi-
got; 35 da ku, gotina ku bi nav-
gîniya peyxamber ve hatiye gotin
bête cîh: Ez ê devê xwe bi weko-
kan ve vekim, tiştên ku ji xuli-
qandina dinê vir ve veşartîne ez ê
eşkere bikim[1].

*Îsa wekoka genim û zîwanê şîrove dike*

36 Wê wextê Îsa gel berda û çû
malê. Û şagirtên wî hatin cem wî
û gotin: Wekoka genim û zîwanê ji
me re şîrove bike! 37 Û Îsa bersiv
da û ji wan re got: Yê ku tovê
qenc çand, Lawê Mirov e; 38 zevî
jî dinya ye û tovê qenc zarokên
Serweriyê ne û zîwan zarokên
yê xerab in; 39 neyarê ku zîwanê
çandiye Îblîs e; dema çinandinê
dawiya dinê ye û oraqvan jî
milyaket in. 40 Û çawa ku zîwanê
dicivînin û dişewitînin, dawiya vê
dinê jî dê ûsa be. 41 Lawê Mirov
dê milyaketên xwe bişîne û ew
ê ji Serweriya wî hemûyên ku,
mirovan ji rê derdixînin û xerabiyê
dikin, hilbijêrin 42 û bavêjin agirê
tifikê; li wir dê bibe girî û qirçîniya
diranan. 43 Wê wextê mirovên
rast dê di Serweriya Bavê xwe de
mîna rojê şewle bidin. Yê ku guhê
wî heye, bila bibihîze!

*Wekoka xizna weşartî û inciyê biqîmet*

44 Dîsa Serweriya Ezmanan mîna
xizna di nav zeviyekê de hati-
ye veşartinê ye. Mirovekî ew dît
û dîsa veşart û bi şabûnê ve çû,
hemû hebûna xwe firot û wê ze-
wiya stend.
45 Dîsa Serweriya Ezmanan mîna
tucarekî, li pey inciyekî qenc ve
digere ye. 46 Û gava wî inciyek
pirr biqîmet dît, ew çû hemû he-
bûna xwe firot û wê stend.

*Wekoka tora masiyan*

47 Dîsa Serweriya Ezmanan mîna
tora bi nava behrê ve hatiye avêtin
e ku, bi her celebî masî dikevinê.

1 Zebûr 78:2

48 Gava tor tijî bû, kaşî qeraxê ki-
rin û rûniştin û masiyên qenc bijar-
tin avêtin qaban, lê belê yên xerab
avêtin derve. 49 Di dawiya dinê de
dê ûsa be; milyaket werin, xeraban
ji qencan hilbijêrin 50 û bavêjin
agirê tifikê; li wê derê dê bibe girî
û qirçîniya diranan. 51 Îsa ji wan re
got: Ma we hemû van tiştan fêhm
kirin? Wan ji wî re gotin: Erê, Xu-
dan! 52 Wî jî ji wan re got: Bona
vê yekê, her qanûnzanekî ku ji bo
Serweriya Ezmanan hîn bûyî, mîna
xwediyê malê ye ku, ew ji xizna
xwe tiştên kevin û nû derdixe.
53 Û wusa bû ku, gava Îsa van
wekokan qedand, ji wê derê çû.
54 Û gava ew hat welatê xwe, di
kenişta wan de ji wan re da hîn ki-
rin; wusa ku, ew ecêb man û go-
tin: Ma ev zanyariya vî zilamî û ev
karên wî yê qudretê ji ku derê ne?
55 Ma ev ne lawê xerat e? Navê
diya wî ne Meryem e? Aqûp û
Ûsiv û Şîmûn û Cihûda ne birayên
wî ne? 56 Ma hemû xwuşkên wî
ne li cem me ne? Niha ev hemû
tiştên vî mirovî ji ku derê ne?
57 Û ew ji wî tilpekî bûn. Lê belê
Îsa ji wan re got: Peyxamberek ji
bajarê xwe û ji mala xwe pê ve li
tu cîhê din ne bêqedir e!
58 Û bona ku ew bêbawerî bûn,
Îsa li wê derê zêde mûcîzetan çê-
nekir.

*Kuştina Yehyayê vaftîzkar*

Marq 6,14-29; Lûq 9,7-9

14 Di wê demê de Hêrodêsê
serdar[1] nav û dengê Îsa
bihîst 2 û ji xizmetkarên xwe re
got: Ev Yehyayê vaftîzkar e; ew
ji nava miriyan vejiyaye; ji ber vê
yekê bi navgîniya wî, kerametên
wusa xwurt tên çêkirin!
3 Ji ber ku Hêrodês, Yehya dabû gir-
tinê, ew girêdabû û avêtibû hepsê,
ji bona Hêrodiya jina Fîlîpoyê birê
xwe. 4 Ji ber ku Yehya ji Hêrodês
re gotibû: Ji te re ne caiz e ku, tu
jina birayê xwe bigirî! 5 Û Hêro-
dês jî dixwest ku, Yehya bê kuştin,
lê belê ji gel ditirsiya; ji ber ku gel
Yehya peyxamber qebûl dikirin.
6 Lê belê gava roja bûyîna Hêro-
dês hat, qîza Hêrodiyayê derket
qadê, reqisî û Hêrodês jê hez kir.
7 Ji ber vê yekê Hêrodês, sond
xwar û got: Ew çi bixwazî, ez ê
bidim wê. 8 Û qîzik ji aliyê diya
xwe ve hatibû fît kirin û got: Li
vir, li ser sêniyekê serê Yehyayê
vaftîzkar bide min! 9 Û qiral
xemgîn bû; lê belê ji bona son-
da xwe û wan mêvanên amade,
emir da ku, xwestina wê bidin
wê. 10 Û wî şand û di hepsê de
serê Yehya da jêkirin. 11 Û serê
wî danîn ser sêniyê, anîn û dan
keçikê; wê jî ji diya xwe re bir.
12 Û şagirtên Yehya hatin, cese-
dê wî rakirin û binax kirin û ew
hatin û ji Îsa re gotin.

[1] Mîrê ku ji çar pariyên welêt, serwerê pariyekî ye.

*Îsa pênc hezar kesî têr dike*

Marq 6,30-44; Lûq 9,10-17; Yû 6,1-14

13 Û gava Îsa vê yekê bihîst, bi lot-
kê ve tenê ji wê derê çû cîhekî ten-
ha. Û dema ajaweyê vêya bihîstin,
ji bajaran ve bi peyatî li pey wî çûn.
14 Û Gava ku Îsa ji lotkê derket,
ajaweyeke mezin dît, dilê wî li wan
şewitî û nexweşên wan baş kir.
15 Û gava bû êvar, şagirtên wî hatin
cem wî û gotin: Ev cîh cîhekî tenha
ye, jixwe wext derbas bû; dev ji gel
berde ku, bila ew herin gundan û ji
xwe re xwarinê bistînin!
16 Lê belê Îsa ji wan re got: Hew-
ce nake ku ew herin; hûn xwarinê
bidin wan! 17 Şagirtan jî ji wî re
gotin: Li vir xeynî pênc nan û du
masiyan tiştekî me tune.
18 Îsa ji wan re got: Wan bînin
vir cem min! 19 Û wî emir da ku,
gel li ser hêşinahiyê rûnin û wî
her pênc nan û herdu masî girt, li
ezmanan ve nihêrt, şikir kir û nan
kerî kir û da şagirtan, şagirtan jî
dan gel. 20 Hemûyan jî xwarin,
têr bûn û donzdeh zembîl jî tijî ji
hûrîkên ber mayî dan hev. 21 Yên
ku xwarin, xeynî jin û zarokan
qasî pênc hezar mêr bûn.

*Îsa li ser avê digere*

Marq 6,45-52; Yû 6,16-21

22 Û Îsa, bona ku bila hema bike-
vin lotkê û heta ku ew gel berde
berî wî derbasî wî aliyê din bibin,
zorê da şagirtên xwe. 23 Û gava
wî gel bi rê kir, çû serê çiyê ku
tenê dua bike û dema ku êvar bû,
ew li wê derê tenê bû. 24 Di wê
demê de, lotke di nava behrê de
bû û ji ber pêlan di talûkê de bû; ji
ber ku ba li dijî wan bû.
25 Û di dora çarê şevê de, Îsa li
ser behrê meşiya û hat cem wan.
26 Lê belê dema şagirtan dîtin
ku, ew li ser golê berbi wan ve tê,
tirsiyan û gotin: Ev xeyalet e! Û
wan ji ber tirsê kirin qêrîn. 27 Lê
belê Îsa wê demê ji wan re got:
Wêrek[1] bin, ez im; metirsin!
28 Pêtrûs bersiv da wî û got: Ya
Xudan! Ger tu yî, emir bide ku ez
li ser avê bêm cem te!
29 Û Îsa got: Were! Pêtrûs jî ji lot-
kê ve peya bû, li ser avê meşiya
ku here cem Îsa. 30 Lê belê gava
wî bayê bihêz dît, tirsiya, dest bi
noqbûnê kir, qêriya û got: Ya Xu-
dan, min xelas bike!
31 Îsa hema destê xwe dirêj kir,
pê girt û ji wî re got: Ya bawerîkê-
mo! Ma te çima şibhe kir?
32 Gava ew ketin lotkê, ba sekinî.
33 Yên ku di lotkê de bûn, jê re
secde kirin[2] û gotin: Bi rastî, tu
Lawê Xwedê yî!
34 Gava ew derbasî aliyê din bûn,
hatin welatê Cênîsartê. 35 Gava
mirovên wî cîhî Îsa nas kirin,

---

1 Dilawêr, cesûr.

2 Jê re peristinê kirin.

şandin hemûya dorûberan û hemû
nexweşan anîn cem wî. 36 Û
nexweşan jê rica dikirin ku, tenê
destê xwe li pêşa kincê wî bidin û
hemûyên ku lê didan, baş bûn.

*Kevneşopên bav û kalan*
Marq 7,1-13

15 Wê wextê Fêrisî û alimên
zagonê ji Orşelîmê hatin
cem Îsa û gotin: 2 Çima şagirtên
te li hember kevneşopa bav û ka-
lan derdikevin? Ji ber ku gava ew
nan dixwin, destê xwe naşon.
3 Îsa bersiv da û ji wan re got: Lê
hûn çima bona adeta xwe, li hem-
ber emrê Xwedê derdikevin? 4 Ji
ber ku Xwedê got: Ji dayik û bavê
xwe re hurmet bike[1]! û: Ew ê ku xe-
rabî bi dayik û bavê xwe bike, bila
muheqeq bête kuştin[2]! 5 Lê belê hûn
dibêjin: Kî ku ji dayik û bavê xwe re
bibêje: Tiştên ku min dikaribû bida
we, min ew tişt da xêra Xwedê! Êdî
ne hewce ye ku ew ji dayik û bavê
xwe re hurmetê bike. 6 Û we ji bona
adeta xwe emrê Xwedê betal kirin.
7 Ya durûno! Îşaya peyxamberi-
yek qenc li ser we kir û got: 8 Ev
gel bi lêvê xwe rûmetê dide min,
lê belê dilê wan ji min dûr e. 9 Pe-
ristina vala ji min re dikin,
ji ber ku ew tenê bi emirên miro-
van didin hîn kirinê[3].

*Tiştê ku ji dil derdikeve mirovan diherimîne*
Marq 7,14-23; Gal 5,19-21

10 Û Îsa gel bangî cem xwe kir û
ji wan re got: Guhdar bin û fêhm
bikin! 11 Ne ku tiştê dikeve dev,
mirovan diherimîne; lê belê tiştê
ku ji dev derdikeve, ew mirovan
diherimîne.
12 Wê wextê şagirtên wî hatin û
jê re gotin: Ma tu zanî, gava Fêri-
siyan ev gotin bihîstin, xeyidîn?
13 Lê belê Îsa bersiv da û ji wan
re got: Her darê ku Bavê minî ez-
manan nedaniye, dê ji binî ve bê
rakirin. 14 Wan berdin; ew kor in
û rêberê koran in! Ger kor ji koran
re rêberiyê bike, herdu jî dê bike-
vin qoncalê.
15 Û Pêtrûs lê vegerand û got:
Şîrova vê wekokê ji me re bike!
16 Û Îsa got: Ma hûn hîn jî fêhm
nakin? 17 Ma hûn fêhm nakin ku,
her tiştê ku dikeve dev, derbasî
zik dibe û derdikeve derve? 18 Lê
belê tiştên ku ji dev derdikevin,
ew ji dil derdikevin û ev mirov
diherimînin. 19 Ji ber ku fikrên
ne qenc, kuştin, zîna, fuhûş, dizîtî,
şehadetiya derew, kufr hemû ji dil
derdikevin. 20 Tiştên ku mirov di-
herimînin ev in! Lê belê bi destê
neşûştî nan xwarin, mirov nahe-
rimîne.

[1] (2.Mûsa 20:12; 5.Mûsa 5:16)
[2] (2.Mûsa 21:17; 5.Mûsa 20:19)
[3] Îşaya 29:13

*Baweriya Pîreka Kenanî*

Marq 7,24-30

21 Û Îsa rabû, ji wê derê çû herê-
ma Sûr û Saydayê. 22 Û a vay,
pîrekek Kenanî ji wê herêmê hat,
kir qêrîn û got: Ya Xudan, Lawê
Dawid; ji min re dilovaniyê bike!
Qîza min di rewşek xerab de bi ci-
nan ve ketiye. 23 Lê belê Îsa go-
tinek bersivê neda wê. Û şagirtên
wî hatin, jê rica kirin û gotin: Wê
ji me dûr bixîne, ji ber ku li pey
me ketiye û dike qêrîn!
24 Lê belê Îsa bersiv da û got: Ez
tenê ji bo mîhên mala Îsraêlê yê
winda bûyî hatime şandin. 25 Lê
belê ew pîreka hat, li ber wî ket ser
rûyê xwe û got: Ya Xudan! Alîkarî
ji min re bike! 26 Û Îsa bersiv da
û got: Ne baş e ku, mirov nanê ber
zarokan bigire û bavêje ber kûçi-
kan. 27 Lê belê pîrekê jî got: Erê,
ya Xudan; lê kûçik jî ji wan hûri-
kên ku ji sifra efendiyê xwe dike-
ve, dixwin! 28 Wê wextê Îsa ber-
siv da û ji pîrekê re got: Ya pîrekê,
baweriya te çiqas mezin e! Bila li
gor xwestina te ji te re bibe! Û di
wê demê de qîza wê baş bû.

*Îsa çar hezar kesî têr dike*

29 Û Îsa ji wê derê çû û hat ber
gola Celîlê û pişt re derket serê
çiyê û li wê derê rûnişt. 30 Û aja-
weyên mezin hatin cem wî ku,
bi xwe re gellek seqet, kor, lal,
destkûd û hîn pirr nexweşên din
jî anîbûn û avêtin ber lingên Îsa
û wî wan baş kir; 31 ûsa ku, gava
gel dît, lal diaxifin, destkûd baş
bûn, seqet geriyan û çavên ko-
ran vebûn, ecêb man û spasdarî ji
Xwedayê Îsraêlê re kirin.
32 Û Îsa şagirtên xwe bangî cem
xwe kir û got: Ez li ber gel dike-
vim; ji ber ku niha sê roj e ew li
cem min in û tiştekî wanî xwarinê
nîne û ez naxwazim, wan birçî
bi rê bikim ku ew di rê de ji xwe
neçin û nekevin. 33 Û şagirtan ji
wî re gotin: Ma li vî cîhê tenha em
ê ji ku derê evqas nan bînin ku, vê
ajaweyê têr bikin? 34 Îsa jî ji wan
re got: Çend nanên we hene? Û
wan gotin: Heft nan û hinek ma-
siyên biçûk hene.
35 Îsa emir da gel ku, ew li ser erdê
rûnin. 36 Û wî her heft nan û masî
girt, şikir kir û parî kir û da şagirtan,
şagirtan jî dan gel. 37 Hemûyan jî
xwarin û têr bûn û heft qufe tijî
hûrikên bermayî dan hev. 38 Yên
ku xwarin jî, xeynî jin û zarokan,
çar hezar mêr bûn. 39 Û paşê Îsa
gel bi rê kir, li keştiyê siwar bû û
hate herêma Magadanê.

*Fêrisî û Sadûqiyan elametekî dixwazin*

Marq 8,11-13

16 Fêrisî û Sadûqiyan hatin û
Îsa ceribandin û jê xwestin
ku, ji ezmanan elametekê nîşanî
wan bide.

2 Lê belê wî bersiv da û ji wan re
got: Gava êvar dibe, hûn dibêjin:
Hewa dê qenc be, ji ber ku ezman
sor e! 3 Û sibê hûn dibêjin: Îro hewa
dê xerab be, ji ber ku ezman sor û
mijdar e! Hûn dikarin rewşa ezman
hilbijêrin, lê gelo hûn nikarin ela-
metên deman hilbijêrin? 4 Nîjadeke
xerab û zinêkir nîşanekê digere, lê
belê jê re xeynî nîşana Yûnis pey-
xamber, nîşanekê din nayê dayîn! Û
Îsa wan hişt û çû.

*Havêna Fêrisî û Sadûqiyan*

Marq 8,14-21; Gal 5,7-10

5 Gava şagirt derbasî wî aliyê dinî
golê bûn, ji bîr kiribûn ku ji xwe
re nan bibirana. 6 Û Îsa ji wan re
got: Bala xwe bidin û xwe ji havê-
na Fêrisî û Sadûqiyan biparêzin!
7 Û ew di nav xwe de fikirîn û
gotin: Ji ber ku me ji xwe re nan
nestendine!
8 Lê belê gava Îsa vêya seh kir, ji
wan re got: Ya bawerîkêmno! Ma
çima hûn bona ku nanê me tune, di
nava hev de galegalê dikin? 9 Ma
hûn hîn fêhm nakin? Nayê bîra we
çawa bi pênc nanî pênc hezar mirov
têr bûn û we çend qufe ji bermayî
dan hev? 10 Û bi heft nanî jî çar
hezar mirov têr bûn û we çend qufe
bermayî dan hev? 11 Ma hûn çawa
fêhm nakin ku, min bona nan ji we
re negot? Lê belê bona wê yekê ku
hûn xwe ji havêna Fêrisî û Sadûqi-
yan biparêzin!
12 Wan wê wextê fêhm kirin ku,
wî ji bona havêna nan ji wan re ne-
got, lê belê bona ew xwe ji hînkiri-
na Fêrisî û Sadûqiyan biparêzin.

*Pêtrûs Mesîh nas dike*

Marq 8,27-30; Lûq 9,18-21

13 Û gava Îsa çû aliyê Qeyseriya
Fîlîpoyê, ji şagirtên xwe pirs kir û
got: Li gor gotina gel, Lawê Mi-
rov kî ye?
14 Û wan gotin: Hinek dibêjin
Yehyayê vaftîzkar e; hinekên din
dibêjin Êlyas e; lê hinekên din jî
dibêjin Yêremya ye, an jî yek ji
peyxamberan e.
15 Îsa ji wan re got: Lê hûn ji bo
min çi dibêjin, ez kî me?
16 Şîmûn Pêtrûs bersiv da û got:
Tu Lawê Xwedayê zindî Mesîh î!
17 Û Îsa bersiv da û ji wî re got:
Xwezî li te, Şîmûnê lawê Yûnis;
ji ber yê ku vêya ji te re vekiri-
ye, ne xwîn û goşt e, lê Bavê
minî ezmana ye! 18 Û ez jî ji te
re dibêjim ku: Tu Pêtrûs î û ez ê li
ser vî zinarî Dêra xwe ava bikim û
dê hêza deriyên welatê miriyan pê
nikaribe. 19 Û ez ê kilîdên Serwe-
riya Ezmanan bidime te û her tiştê
ku tu li ser erdê girê bide, dê ew
ê li ezmanan jî bête girêdan û her
tiştê ku tu li ser erdê veke, dê ew ê
li ezmanan jî bête vekirin.
20 Wê wextê wî emir da şagirtên
xwe ku, ji kesî re nebêjin, ew
Mesîh e.

*Îsa daxuyaniya mirin û*
*vejîna xwe dike*

Marq 8,31-9,1; Lûq 9,22-27

21 Ji vê pê ve Îsa dest pê kir, da-
xuyaniyê ji şagirtên xwe re kir
ku, hewce ye ew here Orşelîmê,
ji destê kalepîran, serokên kahîn-
an û alimên zagonê êşê bikişîne,
bête kuştin û di roja sêwemîn de
biveje. 22 Û Pêtrûs wî da alîkî,
dest pê kir û bi gotina: Ev ji te dûr
be, ya Xudan! Divê tiştekî ûsa
qet li te neqewime! wî azirand.
23 Lê belê Îsa vegeriya û ji Pêtrûs
re got: Ji min dûr keve, Îblîs! Tu
ji min re tilpekî ye, ji ber ku tu
ne tiştên Xwedê, lê tiştên mirovî
difikirî!
24 Wê wextê Îsa ji şagirtên xwe re
got: Her kî ku dixwaze, li pey min
were, bila xwe înkar bike û xaça
xwe hilgire û li pey min were!
25 Ji ber, kî ku dixwaze canê xwe
xelas bike, dê ew ê wê winda bike,
lê belê kî ku canê xwe di oxra min
de winda bike, ew ê wê bibîne.
26 Ji ber, çi fêda wî heye ku, mi-
rov hemûya dinê qezenc bike, lê
canê xwe winda bike? An jî mirov
çi qîmetî dikare, ji bona xelaski-
rina canê xwe bide? 27 Ji ber ku
Lawê Mirov di bilindahiya Bavê
xwe de, dê bi milyaketên xwe ve
bê û wê çaxê dê ji her kesî re li
gor karên wî bersivê bide. 28 Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Ji hin-
ekên ku li vir amade ne, dê mirinê
nebînin, heta ku Lawê Mirov bi
Serweriya xwe ve hatî bibînin!

*Xuyabûna Îsa tê guhertin*

Marq 9,2-13; Lûq 9,28-36

17 Îsa şeş roj pişt re Pêtrûs û
Aqûp û birayê wî Yûhena
girtin cem xwe û ew bi cûdayî bi
xwe re derxist çiyakî bilind. 2 Û
li ber wan xuyabûna wî hate gu-
hertin; rûyê wî mîna rojê biriqî û
kincên wî mîna nûrê sipî bû. 3 Û a
vay, Mûsa û Êlyas ji wan re xuya
bûn û bi Îsa re diaxifîn.
4 Û wê wextê Pêtrûs ji Îsa re got:
Ya Xudan, baş e ku, em li vê derê
ne! Ger tu dixwazî, em ê sê çar-
daxan li vê derê çêkin: Yekî ji te
re û yekî ji Mûsa re û yekî jî ji
Êlyas re. 5 Hîn ew diaxifî, ewrekî
ronahî hate ser wan û a vay, den-
gek ji ewr hat û got: Ev e Lawê
minî xoşewîst, yê ku ez jê razî
me; guhdariya wî bikin! 6 Gava
şagirtan ew deng bihîstin, ketin
ser rûyê xwe û zehf tirsiyan. 7 Lê
belê Îsa nêzîkî wan bû, destê xwe
li wan da û got: Rabin, metirsin!
8 Wan jî çavê xwe bilind kirin û
xeynî Îsa kesek nedîtin.
9 Wexta ku ew ji çiyê dihatin xwar,
Îsa emir da wan û got: Ew tiştê ku
we dîtin, ji kesî re nebêjin, heta ku
Lawê Mirov ji mirinê rabe.
10 Û şagirtên wî jê pirs kirin û go-
tin: Ger wusa be, ma çima alimên
zagonê dibêjin, berê divê Êlyas bê?

11 Û Îsa bersiv da û ji wan re got:
Bi rastî, divê berê Êlyas bê û ew
ê her tiştî ser rast bike. 12 Lê belê
ez ji we re dibêjim: Jixwe Êlyas
hatiye û wî nas nekirin, lê belê her
xwestekên xwe bi wî kirin. Dê
Lawê Mirov jî wusa ji destê wan
keserê bikişîne.
13 Wê çaxê şagirtan fêhm kirin
ku, Îsa bona Yehyayê vaftîzkar ji
wan re dibêje.

*Îsa yekî cinoyî baş dike*

Marq 9,14-29; Lûq 9,37-43

14 Û gava ew hatin cem ajaweyê,
mirovek nêzîkî Îsa bû û li ber wî
çok da û got: 15 Ya Xudan, ji
lawê min re dilovaniyê bike; ji
ber ku ew bi fêwî ye û zehf zeh-
metê dikişîne; ji ber ku gellek ca-
ran dikeve nava agir û gellek ca-
ran jî nava avê! 16 Û min wî anî
cem şagirtên te, lê belê wan hêz
neanîbûn ku wî baş bikin.
17 Û Îsa bersiv da û got: Ya nî-
jada bê bawerî û rêşaş! Ma ez ê
heta kengê tevî we bim? Ma ez ê
heta kengê ji we re sebir bikim?
Wî bînin vir, cem min! 18 Û Îsa bi
cin ve pekiya û cin ji wî derket û
lawik ji wê saetê ve baş bû.
19 Wê wextê şagirt tenê hatin cem
Îsa û gotin: Ma çima me nikarîbû
ku wî derxinin?
20 Îsa jî ji wan re got: Bona ku ba-
weriya we kêm e! Ji ber ku bi rastî
ez ji we re dibêjim: Ger baweriya
we qasî hebeke tova xerdalê hebe,
hunê ji vî çiya re bêjin: Ji vir vekişe
wî alî! dê derbas bibe û tiştekî ku
bona we nebe, dê tune be. 21 Lê
belê ev cinsê ha bi tiştekî din der-
nayê, xeynî bi dua û bi rojiyê.

*Îsa bona mirin û vejîna*
*xwe dîsa dibêje*

Marq 9,30-32; Lûq 9,43b-45

22 Gava ew li Celîlê bûn, Îsa ji wan
re got: Lawê Mirov dê bidin destê
mirovan. 23 Ew ê wî bikujin û roja
sêwemîn, ew ê biveje. Û ji ber vê
yekê şagirt zehf xemgîn bûn.

*Xerca Perestgehê*

24 Gava ew gîhaştin Kefernahûmê,
yên ku nîv şekelî[1] distînin[2], hatin
cem Pêtrûs û gotin: Ma mamosteyê
we nîv şekelî nade[3]?
25 Pêtrûs got: Belê, dide!
Û gava ew hate malê, berî Îsa ji wî
re got: Şimûn! Ma tu çawa texmîn
dikî? Qiralên dinê xercê an jî bacê
ji kî distînin? Ji zarokên xwe, an
ji xerîban? 26 Pêtrûs jê re got: Ji
xerîban.
Îsa jê re got: Hingê zarok azad in.
27 Lê belê bona ku em wan hêrs
nekin, here golê, şewkê bavêje û

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Yên ku baca perestgehê berhev dikin.
3 Baca perestgehê.

masiyê pêşîn ku derdikeve, big-
re, devê wî veke û tuyê şekelekî
bibînî; wê bigre, ji bo min û xwe
bide wan!

*Yê herî bilindtir kî ye?*

Marq 9,33-37; Lûq 9,46-48

18 Wê wextê şagirt hatin cem
Îsa û jê re gotin: Di Serwe-
riya Ezmanan de yê herî mezintir
kî ye? 2 Îsa jî zarokek biçûk bangî
cem xwe kir, wî di nav wan de da
sekinandin 3 û got: Bi rastî ez ji
we re dibêjim: Ger hûn mîna za-
rokan venegerin, hûn tu car nake-
vin Serweriya Ezmanan! 4 Ji ber
vê yekê kî ku xwe mîna vî zarokê
biçûk nizim bike, di nav Serweriya
Ezmanan de yê herî mezintir ew e.
5 Û kî ku zarokekî ûsa biçûk bi navê
min qebûl bike, min qebûl dike.

*Sûcdarî kirin*

Marq 9,42-48; Lûq 17,1-2

6 Lê belê her kî ku bibe sedemê
tilpekîbûna yekî ji van biçûkên ku
bawerî bi min anîne, jê re çêtir e
ku kevirekî êş[1] bi histuyê wî ve
bête daliqandin û bê avêtinê binê
behrê. 7 Wey li serê dinê, ji ber se-
demê tilpekîbûnê! Ji ber ku divê
tilpekî bên; lê belê wey li wî kesî
ku, tilpekî bi navgîniya wî ve tê!
8 Ger destê te an lingê te, dibe
sedemê tilpekîbûnê, wî jêke û ji
xwe bavêje! Ji te re çêtir e ku, tu
destkûd an seqet bikevî jiyînê, ne
ku du dest an du lingên te hebin û
tuyê bi nava agirê abadîn ve bête
avêtin. 9 Ger çavê te, bibe sedemê
tilpekîbûna te, wê derxîne û ji xwe
bavêje! Ji te re çêtir e ku, tu bi ça-
vekî bikevî jiyînê, ne ku bi du ça-
van bikevî nava agirê dojehê.

*Wekoka mîha windabûyî*

Lûq 15,3-7

10 Bala xwe bidin ku hûn yekî
ji wan biçûkan, kêmtir nebînin!
Ji ber ez ji we re dibêjim ku:
Milyaketên wan li ezmanan her
tim rûyê Bavê minî ezmanan
dibînin.
11 Ji ber ku Lawê Mirov bona
ku yê windabûyî xelas bike hat.
12 Gelo hûn çi difikirin? Ger sed
mîhê mirovekî hebin û yek ji wan
rêya xwe şaş bike, ma ew nod û
nehan nahêle, naçe çiyan û li ya
ku rêya xwe şaş kiriye nagere?
13 Ger wê bibîne, bi rastî ez ji
we re dibêjim: Ew ê ji wan nod
û nehên ku rêya xwe şaş nekiri-
ne zêdetir bi wê şa bibe. 14 Ûsa jî
Bavê we yî ezmanan naxwaze ku,
ji van biçûkan yek winda bibe.

*Birayê ku guneh dike*

Lûq 17,3

15 Ger birayê te li dijî te guneh bike,
here, tenê di nava wî û te de, sûcê wî
nîşanî wî bide; ger guh bide gotinên

1 Beraş.

te, te birayê xwe qezenc kir. 16 Lê
belê gava ew li te guhdarî neke, yekî
an jî du kesî bigire cem xwe; ûsa ku,
bila bi devê du an jî sê şahdeyî her
gotin bên tesbît kirin. 17 Û ger ew
nexwaze wan jî guhdarî bike, ji
Dêrê[1] re bêje. Û ger ew nexweze
Dêrê jî guhdarî bike, bila ew ji bo
te bibe mîna pûtperest û karmendê
bacê.

18 Bi rastî ez ji we re dibêjim: Her
çi ku hûn li ser rûyê erdê girêdin,
ew ê li ezman bête girêdan û her
çi ku hûn li ser rûyê erdê vekin,
ew ê li ezman bête vekirin.

19 Dîsa ez ji we re dibêjim: Ger
dudu ji we li ser erdê ji bo her
tiştî ku hûn dixwazin, bibin yek, ji
aliyê Bavê minî ezmanan ve dê ji
wan re çêbibe. 20 Ji ber, li ku derê
du an sê mirov bi navê min bici-
vin, ez li wir di nava wan de me.

*Wekoka xulamê bêdilovan*

Aqûp 2,13

21 Li ser vêya Pêtrûs hat û ji Îsa re
got: Ya Xudan! Gava birayê min li
dijî min guneh bike, divê ez wî çend
carî efû bikim? Heta heft carî?

22 Îsa ji wî re got: Ez ji te re
nabêjim, heta heft carî, lê belê heta
heftê carî heft dibêjim! 23 Ji ber
vê yekê Serweriya Ezmanan mîna
qiralekî ku xwest bi xulamên xwe
re hesabê bibîne ye. 24 Û gava wî
dest bi hesêb kir, yek anîn cem wî
ku, deh hezar talentî deyndarê wî
bû. 25 Lê belê bona ku wî nikaribû
deynê xwe bide, efendiyê wî emir
kir ku ew û jina wî û zarokên wî
û hemû hebûna wî bêne firotin ku,
deynê wî bê dayîn. 26 Wê demê
xulam xwe avête erdê, jê rica kir[2] û
got: Efendî, ji min re sebir bike; ez
ê hemû bidim te! 27 Û dilê efendi-
yê wî xulamî bi wî şewitî, ew ber-
da û deynê wî jê re bexşand.

28 Lê belê gava ew xulam der-
ket, rastî hevalekî xwe yê xulam
hat ku, bi sed dînarî[3] deyndarê wî
bû. Û wî bi qirika wî girt, şidand û
got: Deynê xwe bide! 29 Hevalê
wî yê xulam xwe avête ber lingên
wî û jê rica kir û got: Ji min re se-
bir bike! Ez ê deynê xwe bidim te.
30 Û wî nexwest; lê çû wî avêt gir-
tîgehê, heta ku ew deynê xwe bide.
31 Gava ku hevalên xulam yên din
ev yek dîtin, zehf li ber xwe ketin
û çûn û ji efendiyê xwe re hemû
tiştên ku qewimî bûn, gotin.
32 Wê wextê efendiyê wî, wî bangî
cem xwe kir û jê re got: Xulamê
xerab! Min hemû deynê te ji te re
bexşand, ji ber ku te ji min rica kir.
33 Ma ji te re jî ne lazim bû ku, te
jî ji hevalê xwe re dilovanî bikira,
mîna ku min ji te re dilovanî kir?

---

[1] Civaka bawerkiran.
[2] Jê re secde kir.
[3] Li rasteka menan binêrin.

34 Û efendiyê wî hêrs bû, ew da
îşkencekeran, heta ku hemû deynê
xwe bide. 35 Ger her yek ji we ji
dil birayê xwe nebexşîne, dê Bavê
minî ezmanan jî wusa li we bike.

*Pirsgirêka jinberdanê*

Marq 10,1-12; Lûq 16,18; 1.Kor 7

**19** Û wusa bû ku, gava Îsa ev
axaftina qedand, ji Celîlê
derket û hat sînorê Cihûstanê, ya ji
Urdunê wêdetir e. 2 Û ajaweyeke
mezin ya gel li pey wî çûn û Îsa
wan li wê derê baş kir. 3 Û Fêrisî
hatin cem wî, ew ceribandin û jê re
gotin: Ma dibe ku, bi her sedemekê
mêr jina xwe berde? 4 Îsa bersiv da
û ji wan re got: Ma we nexwendiye
ku di destpêkê de Afirkar, wan jin
û mêr xuliqandiye? 5 Û got: Bona
vê yekê, mêr dayik û bavê xwe
berde û bi jina xwe ve bizeliqe û
dê herdu jî bibin bedenek[1]. 6 Ji
ber vê yekê ew êdî ne dudu ne,
lê belê bedenek in. Ango yên ku
Xwedê wan kiriye yek, bila mirov
wan ji hev neke! 7 Wan ji Îsa re
gotin: Ma çima Mûsa emir da ku,
mêr kaxeza jinberdanê[2] bide jinê
û wê berde? 8 Îsa ji wan re got:
Mûsa bona dil hişkiya we emir
da we ku, hûn jinên xwe berdin;
lê belê di destpêkê de ne ûsa bû.
9 Û ez ji we re dibêjim: Kî ku
xeynî sedema zinê jina xwe berde
û bi yeka din re bizewice, zinê
dike; yê ku bi ya hatiye berdan re
dizewice jî zinê dike.
10 Şagirtan ji Îsa re gotin: Ger
rewşa mêr bi jinê re ûsa be, zewac
ne qenc e! 11 Lê belê Îsa ji wan
re got: Hemû mirov nikarin wê
gotina qebûl bikin; tenê yê ku jê
re hatiye dayîn, dikare qebûl bike.
12 Ji ber, xesandiyê ku ji dayikê
bûyînê ve hene û xesandiyê ji
aliyê mirovan ve hatine xesandin
hene û yên ku xwe di oxra Ser-
weriya Ezmanan de dixesînin jî
hene. Yê ku dikare vêya qebûl
bike, bila qebûl bike!

*Îsa zarokan pîroz dike*

Marq 10,13-16; Lûq 18,15-17

13 Wê demê zarokên biçûk anîn
cem Îsa ku, ew destê xwe deyne ser
wan û dua bike. Lê belê şagirtan b
wan re xeyidîn[3]. 14 Lê belê Îsa got
Zarokên biçûk berdin û pêşiya wa
negirin ku, bila ew bêne cem mir
ji ber ku Serweriya Ezmanan ji yê
ûsa re ye! 15 Û Îsa destê xwe da
ser wan û ji wê derê çû.

*Jiyana abadîn û xortê dewlemend*

Marq 10,13-16; Lûq 18,15-27

16 Û a vay, zilamek nêzîkî Îsa
û got: Ya Mamoste! Ez çi qen

1 (1.Mûsa 2:24)

3 Li wan hilhatin, an jî: Wan azirandin.

yê bikim ku, jiyana abadîn bi dest
bixim? 17 Û Îsa jê re got: Çima
tu bona qenciyê ji min dipirsî?
Xeynî yekî tu kes ne qenc e, ew
jî Xwedê ye[1]! Lê ger tu dixwazî,
bikevî jiyanê, emiran bîne cîh!
18 Wî jî ji Îsa re got: Ma kîjanan?
Îsa jê re got: Mekuje! Zinê meke!
Diziyê meke! Şahdeyiya derewîn
meke[2]! 19 Ji bav û diya xwe re
hurmetê bike û ji cînarê xwe mîna
xwe hez bike[3]!
20 Mirovê xort jê re got: Min
vana hemûyan aniye cîh[4]; êdî çi
kêmasiya min heye? 21 Îsa ji wî
re got: Ger tu dixwazî bêkêmasî
bibî, here, çi tiştê te heye bifiroşe
û bide xizanan û dê li ezmanan
xizna te hebe û were, li pey min
bimeşe! 22 Lê belê dema ku yê
xort ev gotin bihîst, bi xemgînî çû,
ji ber ku zehf hebûna wî hebû.
23 Û Îsa ji şagirtên xwe re got:
Bi rastî ez ji we re dibêjim ku: Ji
dewlemend re zehmet e ku, bikeve
Serweriya Ezmanan! 24 Û dîsa ji
we re dibêjim: Deve dê ji qula der-
ziyê re bi rehetî derbas bibe, lê belê
ji dewlemend re zehmete ku, bike-
ve Serweriya Xwedê! 25 Û gava ku
şagirtan ev yek bihîst, ecêb man û
gotin: Ma êdî kî dikare, xelas be?
26 Û Îsa li wan nihêrt û ji wan re
got: Ev tişt li cem mirovan nemim-
kun e, lê belê li cem Xwedê her tişt
mimkun e.
27 Wê gavê Pêtrûs bersiv da û
ji Îsa re got: A vay, me hemû tişt
hiştin û li pey te hatin, ma ji me re
çi hebe?
28 Îsa jî ji wan re got: Bi rastî
ez ji we re dibêjim: Gava Lawê
Mirov di nûbûna her tiştî de li ser
textê xwe yî bilind rûnî, hûn, yên
ku li pey min tên, hûn ê jî li ser
donzdeh textî rûnin û daraziya
donzdeh eşîretên Îsraêlê bikin.
29 Û kî ku mala xwe, an birayên
xwe, an xwuşkên xwe, an bavê
xwe, an diya xwe, an jina xwe, an
zarokên xwe, an erdê xwe ji bona
navê min li cîh hiştine, ew ê sed
qatî bistînin û dê jiyana abadîn
bi mêrasî bistînin. 30 Lê belê, dê
pirrên pêşîn bibin yê dawî û yên
dawî jî bibin yê pêşîn.

*Yên ku bona di rez de bixebitin hatine bangkirin*

20 Ji ber ku Serweriya Ezma-
nan mîna mirovekî xwe-
diyê malê ye ku, sibê zû, ji bo j
rezê xwe re li xebatkaran bigere
derket. 2 Û ew bi xebatkaran re
roja wan bi dînarekî li hev hat
wan şand rezê xwe. 3 Û nêzîl
saeta sisiyan derket, hinekên di
yên bêkar û betal li qada sûkê d

[1] Tenê yekî qenc heye.
[2] (2.Mûsa 20:12-16; 5.Mûsa 5:16-20)
[3] (3.Mûsa 19:18)
[4] An jî: Min vana hemû ji destpêka xortaniya x
ve anîne cîh.

sekinin dît 4 û ji wan re got: Ka
hûn jî herin rez û heqê we çi be,
ez ê bidim we! 5 Û ew jî çûn.
Dîsa ew di navbera saetên şeşan
û nehan de derket û eynî tişt kirin.
6 Û gava ku ew nêzîkî saeta
yanzdehan derket, hinekên din ên
ku li wir sekinîne dît û ji wan re
got: Ma hûn çima temamiya rojê
li vir betal sekinî ne? 7 Wan jê
re gotin: Ji ber ku tu kesî xebat
neda me! Wî ji wan re got: Hûn
jî herin nav rez û heq çibe, hûn ê
wê bistînin!
8 Û gava ku bû êvar, xwediyê rez
ji serkarê xwe re got: Bangî xebat-
karan bike, heqê wan bide, ji yên
paşîn dest pê bike heta yên pêşîn.
9 Û gava ku ew xebatkarên di saet
yanzdeh de dest pê kiribûn hatin û
her yekî dînarek stendin.
10 Û gava yên pêşîn hatin, wan
gotin qey dê ew zêde bistînin; lê
belê wan jî her yekî dînarek sten-
din. 11 Û gava wan heqê xwe
stendin, li hember xwediyê malê
gotegot kirin û gotin: 12 Ev, yên
ku paşiyê ne, saetekî xebitîn û te
ew bi yên ku giraniya rojê û ger-
ma wê kişandine, bi me re yek
girt!
13 Lê belê wî bersiv da û ji wan
yekî re got: Heval, ez neheqiyê li
te nakim! Ma tu bi min re bi dîna-
rekî re qayîl nebûyî? 14 Heqê xwe
bistîne û here! Ez dixwazim, çawa
ku min da te, ûsa jî bidime ewên
paşîn. 15 Ma heqê min tune ku,
ez her çi bixwazim, bi malê xwe
bikim? An tu comerdiya min bi
çawên xerab dibînî?
16 Bi vî awayî dê yên dawîn bibin
yên yekemîn û yên yekemîn bibin
yên dawîn. Ji ber ku vexwendî[1]
pirr in, lê belê bijartî hindik in.

### *Îsa cara sêwemîn qala mirin û vejîna xwe dike*

Marq 10,32-34; Lûq 18,31-34

17 Û gava ku Îsa derket Orşelîmê,
her donzdeh şagirtên xwe wekî
din rahişt û di rê de ji wan re got:
18 A vay, em diçin Orşelîmê û
Lawê Mirov dê bidine destê se-
rokên kahînan û alimên zagonê û
ew ê wî bi ceza mirinê daraz bikin
19 û dê wî bidin destê neteweyan,
bona ku qerfên xwe bi wî bikin,
bidin ber qamçiyan û wî xaç bikin
û ew ê roja sisiyan ji mirinê rabe.

### *Şîreta li dayika ku cihêtiyê dixwaze*

Marq 10,35-45

20 Li ser vêya dayika lawên Ze-
bedî tevî lawên xwe hate cem wî,
jê re secde kir û xwestinekê ji wî
xwest. 21 Û Îsa ji wê re got: Tu çi
dixwazî? Wê jî ji wî re got: Destûr
bide ku, ev herdu lawên min di
Serweriya te de, yek li aliyê te yî
rastê û yê din jî li aliyê te yî çepê

22 Lê belê Îsa li wan vegerand
û got: Hûn nizanin ku, hûn çi
dixwazin! Ma hûn dikarin, ji
kaseya[1] ku ez vedixwim vexwin?
Wan ji Îsa re gotin: Em dikarin!
23 Îsa ji wan re got: Bi rastî
hunê kaseya min vexwin, lê belê
rûniştandina aliyê minî rastê û
çepê ne di destê min de ye; lê belê
ew der bona yên ku ji aliyê Bavê
min ve hatiye amadekirin e.
24 Û dema deh şagirt vêya bihîstin,
ji herdu birayan re xeyidîn. 25 Lê
belê Îsa wan bangî cem xwe kir
û got: Hûn dizanin ku, serokên
neteweyan serweriyê li wan dikin
û mezinên wan serweriyê li ser
wan dajon. 26 Di nav we de ne
ûsa be; lê belê di nav we de her
kî ku dixwaze bibe yê mezin, bila
bibe xizmetkarê we 27 û her kî
ku dixwaze, di nav we de bibe
yê yekem, bila bibe koleyê we.
28 Çawa ku Lawê Mirov nehatiye
ku jê re xizmetê bikin, lê hatiye
ku xizmetê bike û bona gellekan
canê xwe bi fîdyetî bide.

*Îsa çavên du koran vedike*

Marq 10,46-52; Lûq 18,35-43

29 Û gava ku ew ji Erîhayê derke-
tin, ajaweyeke mezin li pey Îsa çû.
30 Û a vay, du korên ku li qeraxa
rê rûniştîbûn, gava wan bihîstin ku
Îsa derbas dibe, kirin qêrîn û gotin:
Ya Xudan, Lawê Dawid, ji me re
dilovaniyê bike! 31 Lê belê ajawe,
bona ku dengê xwe bibirin, wan
azirandin. Lê belê wan hîn zêde ki-
rin qêrîn û gotin: Ya Xudan, Lawê
Dawid, ji me re dilovaniyê bike!
32 Û Îsa sekinî û bangî wan kir û
got: Ma hûn çi dixwazin ku, ez ji
bo we bikim? 33 Wan jî jê re go-
tin: Ya Xudan, bila çavên me ve-
bin! 34 Û dilê Îsa bi wan şewitî û
dest danî ser çavên wan û wê demê
çawên wan dîtin û li pey wî çûn.

*Îsa diçe Orşelîmê*

Marq 11,1-11; Lûq 19,28-40;
Yû 12,12-19

21 Û gava ku ew nêzîkî
Orşelîmê bûn û hatin Bêyt-
facê, li cem Çiyayê Zeytûnê, Îsa
du şagirtên xwe şand û ji wan re
got: 2 Herin wî gundê li hember
û hûn ê kerekî girêdayî û li cem jî
dehşika wê bibînin û wan vekin û
bînin cem min! 3 Ger kesek ji we
re tiştekî bibêje, hûn bibêjin: Ew
ji Xudan re lazim in û ew ê hema
wan bişîne. 4 Ev ûsa bû ku, ew
gotina bi navgîniya peyxamber ve
hatiye gotin bête cîh: 5 Ji qîza Si-
yonê re bibêjin: A vay, Qiralê te,
tê cem te, bi xûnermî û li kerekî,
heta li dehşika kerekî siwarbûyî[2].
6 Şagirt çûn, mîna ku Îsa emir dabû
wan kirin. 7 Ker û dehşik anîn, kin-

cê xwe avêtin ser wan û Îsa lê siwar
bû. 8 Û pirraniya gel kincê xwe li
ser rê raxistin û hinekên din guli-
yê daran jê dikirin û wan li ser rê
radixistin. 9 Û ajaweyên ku di pêş
û paşê Îsa de dimeşiyan, diqêriyan
û wusa digotin: Hosanna[1] ji Lawê
Dawid re! Yê ku bi navê Xudan tê
Pîroz e! Hosanna ji herî jorîn ve!
10 Gava Îsa kete Orşelîmê, hemûya
bajêr hejiya û gotin: Ev kî ye? 11
Û ajaweyê got: Ji bajarê Nisreta
Celîlê, Îsa Peyxamber ev e!

*Îsa Perestgehê paqij dike*

Marq 11,15-19; Lûq 19,45-48;
Yû 2,13-22

12 Û Îsa ket Perestgeha Xwedê û
hemû kesên ku di Perestgehê de
danûstendinê dikirin avêt derve
û dezgên kesên ku pere hûr dikin
û kursiyên kevokfiroşan gêr kir.
13 Û wî ji wan re got: Hatiye nivî-
sin: Ji mala min re dê mala duayê
bête gotin[2], lê belê we wê kirine
şkefta rêbiran! 14 Û di Perestgehê
de kor û seqet hatin cem wî û wî
wan baş kir. 15 Lê belê gava se-
rokên kahînan û alimên zagonê
ew kerametên ku, Îsa kir û ew za-
rokên ku, di Perestgehê de dikirin
qêrîn û digotin: Hosanna ji Lawê
Dawid re! dîtin, bi hêrs ketin 16 û
ji wî re gotin: Ma tu dibihîzî, vana
çi dibêjin? Îsa jî ji wan re got:
Belê! Ma qey we gotina ku dibêje:
Te bi devê zarokên biçûk û yên li
ber şîr, pesn ava kir[3]; qet nexwen-
diye? 17 Û wî wan li cîh hişt, ji
bajêr derket û çû Beytanyayê û
şevê li wê derê derbas kir.

*Dara hêjîrê*

Marq 11,12-14; 11,20-26

18 Û sibehê zû, dema ku Îsa vedi-
geriya bajêr, birçî bû. 19 Û dema li
kêleka rê dareke hêjîrê dît, çû cem
wê; lê belê xeynî pelan tiştekî din
pê ve nedît û wî ji wê re got: Bila
êdî ji te abadîn mêw dernekeve! Û
dara hêjîrê hema hişk bû. 20 Gava
ku şagirtan ev yek dîtin, ecêb man
û gotin: Çawa dara hêjîrê hema
hişk bû?
21 Îsa bersiv da û ji wan re got:
Bi rastî ez ji we re dibêjim: Ger
baweriya we hebe û hûn şibhe ne-
kin, hûn ê ne tenê çi hate serê vê
dara hêjîrê bikin, lê belê hûn ê ji
vî çiyayî re bêjîn: Rabe û bikeve
behrê! dê bibe. 22 Û di duê de bi
bawerî kirinê, hûn her çi bixwa-
zin, hûn ê bistînin.

*Pirsa di derheqê rayedariya Îsa de*

Marq 11,27-33; Lûq 20,1-8

23 Û gava ku Îsa hate Perestgehê
û ders dida, serokên kahînan û ka-

---

1 Di maneya ji me re kerem bike de ye.
2 Îşaya 56:7
3 Zebûr 8:12

lepîrên gel hatin cem wî û gotin:
Ma tu bi çi rayedariyê van tiştan
dikî û kê ev rayedariya daye te?
24 Û Îsa bersiva wan da û got: Ez jî
ji we pirsekî bipirsim, ger hûn ji min
re bêjin, ez ê jî ji we re bêjim ku, bi
çi rayedariyê ez van tiştan dikim.
25 Vaftîza Yehya ji ku ve bû? Ji
ezmanan bû, an ji mirovan bû? Ew
di nav xwe de fikirîn û gotin: Ger
em bêjin: Ji ezmanan, ew ê ji me re
bêje: Ma we çima bawerî pê neanîn?
26 Lê belê gava em bêjin: Ji mi-
rovan, em ji gel ditirsin; ji ber ku
hemû Yehya peyxamber qebûl di-
kin. 27 Û wan bersiv dan Îsa û go-
tin: Em nizanin! Li ser vê Îsa ji wan
re got: Ez jî ji we re nabêjim ku, ez
bi çi rayedariyê van tiştan dikim.

### *Wekoka du lawan*

28 Ma hûn çi difikirin? Du lawê
mirovekî hebûn û wî ji lawê xwe
yî yekemîn re got: Lawo, îro here
nav rezê min, bişuxule! 29 Wî jî
bersiv da û got: Ez naxwazim!
Lê belê paşê poşman bû û çû.
30 Mirov çû cem yê din û dîsa
ûsa got. Wî bersiv da û got: Erê,
ez ê herim, efendiyê min! û neçû.
31 Ji van herduyan kîjanî xwesti-
na bavê xwe kir? Wan jî got: Yê
pêşî. Îsa ji wan re got: Bi rastî ez
ji we re dibêjim ku: Dê karmen-
dên bacê û pîrekên fahş berî we
bikevin Serweriya Xwedê! 32 Ji
ber ku Yehya di rêya rastiyê de ji
we re hat, we bawerî pê neanîn;
lê belê karmendên bacê û pîrekên
fahş bawerî pê anîn û piştî ku we
ew dît, dîsa jî bona baweriyê bi wî
bînin hûn poşman nebûn.

### *Wekoka kirêkirên rez*

Marq 12,1-12; Lûq 20,9-19; Îşa 5,1-7

33 Guh bidin wekokeke din: Mi-
rovekî xwediyê malê hebû, rez
danî û dora wê çeper kir û çalek tê
de kola û qûleyek çêkir û wî rez bi
kirê da rezvanan û çû welatekî din.
34 Gava wextê tirî dayînê nêzîk
bû, wî xizmetkarên xwe şand cem
rezvanan ku, tiriyê jê re bînin.
35 Lê belê rezvanan xizmetkarên
wî girtin, li yekî xistin, yê din
kuştin û yekî din jî dan ber kevi-
ran. 36 Wî dîsa ji cara pêşîn zê-
detir xizmetkar şand û rezvanan bi
wan jî dîsa ûsa kirin. 37 Lê belê
di dawiyê de lawê xwe şand cem
wan û got: Dê ew ê hurmetê ji lawê
min re bikin! 38 Lê belê gava ku
rezvanan law dîtin, ji hev û din re
gotin: Mêrasxwer ev e! Werin, em
wî bikujin û bibin xwediyê mêrasa
wî! 39 Û rezvanan ew girtin, ji nav
rez avêtin derve û kuştin. 40 Ger
wexta ku xwediyê rez bê, ma ew ê
çi bi wan rezvanan bike?
41 Wan ji Îsa re got: Dê wan zi-
lamên xerab, bi awayekî xerab
bikuje û rez jî bide rezvanên din,
yên ku dê di wextê de tiriyê rezê
wî bidinê.

42 Îsa ji wan re got: Ma we di Ni-
vîsên Pîroz de qet nexwendiye?
Ew kevirê ku hostan red kirin, bû
kevirê serê quncikê. Ev, ji aliyê
Xudan ve bû û ev li ber çavên me
karekî nuwaze ye[1]!
43 Ji ber vê yekê ez ji we re
dibêjim: Serweriya Xwedê dê ji
we bête stendin û ji neteweyekî
ûsa re bête dayîn ku, mêwa wî
bigihîne. 44 Û yê ku di ser vî ke-
virî de bikeve, dê perçe bibe û ew
bikeve ser kê, dê wî bipelixîne.
45 Û gava ku serokên kahînan û
Fêrisiyan wekokên wî bihîstin,
fêhm kirin ku, ew ji bona wan
dibêje. 46 Û her çiqas xwestin ku
bi wî bigirin jî, ji gel tirsiyan; ji
ber ku wan wî peyxamberek dihe-
sibandin[2].

*Wekoka xwarina Dawetê*

Lûq 14,15-24

22 Û Îsa dîsa bi wekokan ji
wan re axifî û got: 2 Serwe-
riya Ezmanan mîna qiralê daweta
lawê xwe dike ye ku, 3 bona bangî
vexwendiyên dawetê bikin, xiz-
metkarên xwe şandin; lê belê wan
nexwestin ku werin. 4 Qiral dîsa
xizmetkarên din şand û got: Ji ve-
xwendiyan re bêjin: A vay, min zi-
yafeta xwe amade kiriye, cange û
dewarên xwe yî qelew şerjêkiriye
û her tişt amade ye; werin dawetê!
5 Lê belê wan guh nedan, yek çû
zeviya xwe û yê din jî çû danû-
stendina xwe. 6 Û yên mayîn jî
xizmetkarên wî girtin, heqaretê
lê kirin û kuştin. 7 Lê belê qi-
ral qariya û artêşa xwe şand, ew
mêrkujana qir kir û bajarên wan
şewitand.
8 Piştre ji xizmetkarên xwe re
got: Dawet amade ye, lê belê ve-
xwendî ne hêja bûn. 9 Ka herin
serê rêyan û kê ku hûn bibînin,
bangî dawetê bikin! 10 Xizmetkar
jî derketin rêyan, qenc û xerab her
kî dîtibin, hemû dan hev û mala
dawetê bi mêvanan ve tijî bû.
11 Lê belê gava qiral hat hundir
ku mêvanan bibîne, mirovek li
wê derê dît ku, kincê dawetê lê
tunebû. 12 Û ji wî re got: Heval!
Ma tu çawa bê kincê dawetê ketî
vir? Û zimanê wî hate girtin.
13 Wê wextê qiral ji xizmetkarên
xwe re got: Dest û lingên wî girê
bidin û bigirin û wî bavêjin tariya
derve! Li wê derê dê bibe girîn û
qirçîniya diranan. 14 Ji ber yên ku
hatine bangkirin zehf in, lê belê
bijartî hindik in!

*Pirsa xerc dayînê*

Marq 12,13-17; Lûq 20,20-26

15 Li ser vêya Fêrisî çûn û bona
ku ew Îsa bi gotina wî çawa bixin
dafikê, bi hev re şêwirîn. 16 Û

1 Zebûr 118:22-23

2 Qebûl dikirin.

wan şagirtên xwe tevî piştgirtiyên
Hêrodês şandin cem Îsa û gotin:
Mamoste, em dizanin ku, tu rast î
û rêya Xwedê bi rastî didî nasîn; ji
kesî re cihêtiyê nakî; ji ber ku tu li
şexsê mirovan nanihêre. 17 Niha ji
me re bêje, ka fikrê te çi ye: Rast e
ku, em bacê bidin Qeyser an na?
18 Lê belê Îsa bi nêta[1] wan ya xe-
rab zanîbû û got: Ya durûno, ma
hûn çima min diceribînin? 19 Ka
pereyê bac dayînê nîşanî min bi-
din! Û wan dînarek[2] ji Îsa re anîn.
20 Îsa jî ji wan re got: Ev sûret û
nivîsa yên kî ne? 21 Wan got: Yên
Qeyser in. Li ser vê Îsa ji wan re
got: Balê, tiştên Qeyser bidin Qey-
ser û yên Xwedê jî bidin Xwedê!
22 Û gava wan vêya bihîstin, ecêb
man, dev ji wî berdan û çûn.

*Pirsgirêka vejîna miriyan*

Marq 12,18-27; Lûq 20,27-40

23 Wê rojê Sadûqiyan ku digotin
vejîna miriyan tune, hatin cem
Îsa, jê pirsiyan û gotin: 24 Ya Ma-
moste! Mûsa got: Ger mirovek
ku zarokên wî nebin bimire, bila
birayê wî jina wî bistîne û ji bi-
rayê xwe re nîjadê rake[3]. 25 Bi vî
awayî heft bira li cem me hebûn.
Yê mezin zewicî û mir. Ji ber ku
zarokên wî tune bûn, jina xwe ji
birayê xwe re hişt. 26 Ûsa hate
serê yê duduyan û yê sisiyan jî,
heta yê heftan ûsa mirin. 27 Li pey
hemûyan pîrek jî mir. 28 Niha,
roja qiyametê ew jin dê bibe jina
kîjanî ji wan her heftan? Ji ber ku
hemûyan ew stendibûn.
29 Lê belê Îsa bersiv da û ji wan
re got: Hûn ketine xeletiyê, ji ber
ku hûn ne Nivîsên Pîroz[4] zanin
û ne jî hêza Xwedê. 30 Ji ber ku
roja qiyametê ne ew ê bizewicin,
ne jî mêr bikin, ji ber ku dê mîna
milyaketên ezmanan bin. 31 Ma
we ew gotina ku, Xwedê ji bona
vejîna miriyan ji we re gotiye,
nexwendiye? ya ku dibêje: 32 Ez
Xwedayê Birahîm û Xwedayê Îs-
haq û Xwedayê Aqûp im[5]. Xwedê
ne Xwedayê miriyan, lê Xwedayê
zindiyan e.
33 Û gava gel vêya bihîstin, li ser
hînkirina wî zehf ecêb man.

*Emrê herî mezin*

Marq 12,28-34; Lûq 10,25-28

34 Û gava Fêrisiyan bihîstin ku,
Îsa Sadûqiyan hiş kiriye, li hev
civiyan 35 û ji wan alimekî olê,
Îsa ceriband û ji wî pirs kir: 36 Ya
Mamoste, di zagonê de emrê herî
mezin kîjan e? 37 Îsa ji wî re got:
Xudan, Xwedayê xwe bi hemûya
dilê xwe û bi hemûya canê xwe
û bi hemûya aqilê xwe hez bike[6]!

---

1 Niyet, mebest.
2 Li rasteka menan binêrin.
3 (5.Mûsa 25:5)
4 Di nivîsên Yewnanî de: Nivîsan e.
5 (2.Mûsa 3:6)
6 (5:Mûsa 6:5)

38 Emrê pêşîn û mezin ev e.
39 Û ya duduyan a ku, mîna vêya
ye, ev e: Ji cîranê xwe mîna xwe
hez bike[1]! 40 Hemû zagon û pey-
xamberan bi van her du emiran ve
girêdayî ne.

*Mesîh Lawê kî ye?*

Marq 12,35-37; Lûq 20,41-44

41 Gava Fêrisî civiyan, Îsa ji wan
pirs kir 42 û got: Ma hûn ji bona
Mesîh çi difikirin? Ew Lawê kê
ye? Wan jî ji Îsa re gotin: Lawê
Dawid e. 43 Îsa ji wan re got: Wê
gavê, çawa dibe ku, Dawid di Ruh
de bi gotina Xudan bangî wî dike
û dibêje: 44 Xudan ji Xudanê min
re got: Heta ku ez neyarên te ji
lingên te re pêlik deynim, li rastê
min rûnê[2]? 45 Ger Dawid ji wî re
dibêje Xudan, çawa ew dibe lawê
wî? 46 Û qet kesekî bi gotinekê
bersivê neda wî. Û paşî wê rojê
êdî kesekî newêribû ku, jê pirs jî
bikira.

*Daraziya li dijî Alimên Olê û Fêrisiyan*

Marq 12,38,39; Lûq 11,43-46; 20,45-47

23 Wê wextê Îsa ji gel û
şagirtên xwe re axifî û got:
2 Alimên zagonê û Fêrisiyan li ser
kursiya Mûsa rûdinin. 3 Ji ber wê
yekê ew çi ji we re bêjin, ûsa bikin
û bînin cîh; lê belê mîna karên wan
nekin; ji ber ku ew dibêjin û na-
kin. 4 Erê, ew barên giran û dijwar
girêdidin, datînin ser pişta miro-
van, lê belê ew bi xwe naxwazin,
bi tiliya xwe jî wan bileqînin. 5 Lê
belê ew hemû xebatên xwe ji bo
dîtina mirovan dikin. Ji ber ku ew
berbejnên xwe fireh û pêşê kincên
xwe dirêj dikin; 6 di ziyafetan de
cîhên jorîn û li keniştan ji kursi-
yên pêşîn 7 û di qadên sûkan de
ji silavan û ji aliyê mirovan ve jî
bi gotina: Ya Mamoste bên bang
kirinê, hez dikin. 8 Lê belê bila ji
we re nebêjîn: Mamoste, ji ber ku
Mamosteyê we yek e û hûn hemû
bira ne. 9 Li ser rûyê erdê hûn ji
tu kesî re nebêjin: Bavo, ji ber ku
Bavê we yek e, ew jî Bavê ezmanî
ye. 10 Ne jî ji we re bêjin: Efen-
dî, ji ber ku Efendiyê we yek e,
Mesîh e. 11 Lê belê di nav we de
yê herî mezin bila bibe xizmetkarê
we. 12 Kesê ku xwe bilind bike,
dê were nizm kirin û kesê ku xwe
nizm bike, dê were bilind kirin.

*Wey li durûyan*

Marq 12,40; Lûq 11,39-42; 52; 20,45-47

13 Lê belê wey li we alimên za-
gonê û Fêrisiyan, durûno! Ji ber
ku, hûn Serweriya Ezmanan li
rûyê mirovan digirin! Ne hûn di-
kevinê û ne jî dihêlin, ewên ku
dixwazin, bikevinê.

1 (3.Mûsa 19:18)

2 Zebûr 110:1

14 Wey li we alimên zagonê û
Fêrisiyan, durûno! Ji ber ku hûn li
aliyekî bona bidine xuyanî kirinê
duayên dirêj dikin, lê li aliyê din jî
hûn malên jinebiyan dadiqurtînin.
Ji bo vê yekê dê daraziya we hîn
jî girantir bibe!
15 Wey li we alimên zagonê û
Fêrisiyan, durûno! Ji ber ku hûn li
behr û erdê digerin ku, yekî bînin
ser baweriya xwe û gava ku dibe,
hûn wî ji xwe du qatî zêdetir dikin
lawê dojehê!
16 Wey li we rêberên kor, yên ku
dibêjin: Kî ku li ser Perestgehê
sond bixwe, ne tiştek e; lê belê
kî ku li ser zêrên Perestgehê sond
bixwe, dê bibe deyndar. 17 Hûn,
ya xêvikno û korno! Ma kîjan me-
zin e? Zêr an Perestgeha ku zêr
pîroz dike? 18 Û dîsa hûn dibêjin:
Kî ku bi gorîgehê sond bixwe ne
tiştek e, lê belê kî ku bi boraqa
li ser gorîgehê sond bixwe, dibe
deyndar. 19 Hûn, ya korno! Ma
kîjan mezin e? Boraq, an gorîge-
ha ku boraqê pîroz dike? 20 Ji ber
vê yekê kî ku bi gorîgehê sond
dixwe, ew him bi wê sond dixwe
û him jî bi hemû tiştên ku li ser
wê hene sond dixwe. 21 Û kî ku
bi Perestgehê sond dixwe, ew him
bi wê sond dixwe û him jî bi yê
ku di wê de dijî sond dixwe. 22 Û
kî ku bi ezmanan sond dixwe, ew
him bi textê Xwedê sond dixwe
û him jî bi yê ku li ser rûniştiye
sond dixwe.
23 Wey li we alimên zagonê û
Fêrisiyan, durûno! Ji ber ku hûn
deheka pûjanê û anixê û reşkeyê
didin û tiştên zagonê yên hîn
girîngtir, dadiyê û dilsoziyê û
baweriyê berdidin! Divê we wan
bikirana û dev ji vana jî berneda-
na! 24 Ya rêberên kor! Hûn mêşa
biçûk diparzînin û cihê dikin, lê
belê devê dadiqurtînin!
25 Wey li we alimên zagonê û Fêri-
siyan, durûno! Ji ber ku hûn rûyê
derve yî fîncan û pincê paqij di-
kin, lê belê hundirê wan bi talan û
xoroşiyê[1] ve tijî ne! 26 Ya Fêrisiyê
kor! Pêşiyê hundirê fîncan û pincê
paqij bike ku, li derve jî paqij bibe.
27 Wey li we alimên zagonê û Fêri-
siyan, durûno! Ji ber ku hûn mîna
gorên sipî kirine ku, ji derve qenc
xuya dibin, lê belê hundirê wê bi
hestiyê miriyan û bi hemû herami-
yê ve tijî ye! 28 Hûn jî, ûsa ji derve
bi mirovan re qenc xuya dibin, lê
belê ji hundir ve hûn bi durûtî û fe-
sadiyê ve tijî ne.

*Îsa durûtiyê daraz dike*

Lûq 11,47-51

29 Wey li we alimên zagonê û
Fêrisiyan, durûno! Hûn gorên pey-
xamberan çêdikin, gorên kesên sa-
lih jî dixemilînin 30 û dibêjin: Ger
em di rojên bavên xwe de hebûna,

[1] Binketê nefsa xwe, aşirîtî.

me li tev wan xwîna peyxamberan
nedirijandin. 31 Bi vî awayî hûn bi
xwe şehadetî didin ku, hûn lawên
yên ku peyxamber kuştine nin.
32 Belê, hûn jî pîveka bavên xwe
tijî bikin! 33 Hûn, hey marno! Hûn,
hey nîjada margîskan! Ma hûn ê
çawa ji dîwana dojehê birevin?
34 Bi vî awayî, a vay, ez ê ji we
re peyxamberan û mirovên zana
û alimên zagonê bişînim; hûn
ê ji wana hinekan bikujin û xaç
bikin û hinekan di keniştên xwe
de bidin ber qamçiyan û bajar bi
bajar biqewirînin 35 ku; hemû
xwîna bêsûc, ya li ser rûyê erdê
hatiye rijandin dê bê ser we; ji
xwîna Habîlê bê sûc heta xwîna
Zekeryayê lawê Berexya, ew ê ku
we di nav Perestgeh û gorîgehê de
kuşt. 36 Bi rastî ez ji we re dibêjim:
Ev hemû tişt dê bên serê vî nifşê!

*Îsa bona Orşelîmê digirî*

Lûq 13,34-35; 19,41-44

37 Orşelîm, Orşelîma ku peyxam-
beran dikuje û şandiyên ku jê re
hatine şandin kevir dike! Çend
caran xwestim ku, ez zarokên te li
cem xwe bicivînim, çawa mirîşk
çêlikên xwe di binê perên xwe de
dicivîne, lê belê we nexwestin!
38 A vay, dê mala we li we wêran
û vala bimîne. 39 Ji ber ku ez ji
we re dibêjim: Heta ku hûn bêjin:
Yê ku bi navê Xudan tê, Pîroz be!,
êdî hûn ê min nebînin.

*Nîşanên dawiyê*

Marq 13,1-4; Lûq 21,5-7

24 Û gava Îsa ji Perestgehê
derket û çû, şagirtên wî ha-
tin cem wî ku xaniyên Perestgehê
nîşanî wî bidin. 2 Îsa jî bersiv da
wan û ji wan re got: Ma hûn van
hemûyan nabînin? Bi rastî ez ji we
re dibêjim: Li vir kevir li ser kevir
namîne ku, neyê hilweşandin!
3 Wexta ku Îsa li ser Çiyayê Zey-
tûnê rûniştîbû, şagirtên wî bi tenê
hatin cem wî û ji wî pirsiyan: Ji
me re bêje, ma ew tiştana dê ken-
gê bibin? Nîşana hatina te û dawi-
ya vê dinê dê çi be?

*Nûçegîhanên nûçeya herî neqenc*

Marq 13,3-13; Lûq 21,7-19

4 Îsa bersiv da û ji wan re got:
Hay ji xwe hebin, nebe ku kes we
ji rê derxîne! 5 Ji ber ku gellek dê
bi navê min bên û bêjin: Mesîh
ez im û dê gellekan ji rê derxînin!
6 Hûn ê dengê şeran û gotinên
şer bibihîzin, hay ji xwe hebin
ku, hûn netirsin; ji ber hewceye
ku ev tişt bibin; lê belê hîn dawî
nîne. 7 Ji ber ku gel li hember
gelan û qiraletî li hember
qiraletiyan rabin, cîh cîhan dê
birçîtî û erdhejînan bibin. 8 Lê
hemûya van tiştan, destpêka jana
ne.
9 Wê wextê dê tengasiyê bidin
we, we bikujin û bona navê min
hemûya gelan ji we bikerihin.

10 Û wê gavê gellek tilpekî bi-
bin, hev û din didin dest û ji hev
û din bikerihin. 11 Û dê gellek
peyxamberên sexte derkevin û
gellekan ji rê derxînin. 12 Û ji bo
zêdebûna xerabiyê, dê hezkirina
gellekan sar bibe. 13 Lê belê kî
ku heta dawiyê ber xwe bide, ew
ê xelas bibe. 14 Û ev Mizgîniya
Serweriyê, bona ku ji hemûya
netewan re şahdeyiyê bike, dê li
hemûya dinê ve bête waz dayîn û
dawî dê wê demê were.

*Hatina êşa giran*

Marq 13,14-23; Lûq 21,20-24

15 Niha, gava tiştê têkçûnê tîne û
mekruh ya ku bi navgîniya Danîêl
peyxamber ve hatiye gotin[1], hûn
li cîhê pîroz çikandî bibînin – bila
xwendevan fêhm bike –, 16 wê
wextê yên ku li Cîhûstanê ne, bila
birevin çiyan; 17 yê li ser xanî ye,
bila ji wir neyê xwarê ku, ji mala
xwe tiştekî bigire 18 û yê ku li nav
zeviyê ye jî, bila bona girtina eba
xwe venegere. 19 Lê belê wey li
ducanî û berdergûşa, di wan rojan
de! 20 Dua bikin ku, bila reva we
li zivistanê, an jî di roja Sebtê de
nebe. 21 Ji ber ku wê wextê ten-
gasiyekî ûsa mezin dê bibe ku, ji
destpêka dinê ve heta niha mîna
wê nebûye û tu car dê nebe jî.
22 Ger ew rojana nehatana kurt
kirin, tu kes xelas nedibû; lê belê
ji bona xatirê bijartiyan dê ew ro-
jana bên kurt kirin. 23 Wê wextê,
ger yek ji we re bêje: A vay, Mesîh
li vir e! an jî: Ew li wir e! bawer
nekin. 24 Ji ber ku Mesîhên sexte
û peyxamberên sexte dê derkevin,
elamet û nuwazeyên mezin bikin
ku, ger mimkun be bijartiyan jî ji
rê ve derxînin. 25 A vay, min ji
berê ve ji we re got.
26 Ger ew ji we re bêjin: A vay,
ew li çolê ye! dernekevin, an
bêjin: A vay, ew di oda hindur
de ye! bawer nekin. 27 Ji ber ku
çawa birûsk ji rojhilatê derdikeve
û heta rojavayê xuya dike, dê hati-
na Lawê Mirov jî ûsa be. 28 Ji ber
ku li ku derê berate[2] hebe, qertel jî
li wir bicivin.

*Hatina Lawê Mirov*

Marq 13,24-27; Lûq 21,25-28;
Dan 7,13-14

29 Lê belê hema li pey tengasiya
wan rojan, dê roj tarî bibe û heyv
ronahiya xwe nade; dê sterk ji ez-
mên bikevin û dê qudretên ezma-
nan bihejin. 30 Wê gavê nîşana
Lawê Mirov dê li ezmanan xuya
bibe û wê gavê hemûya netewe-
yên dinê li xwe bixin û dê hatina
Lawê Mirov li ser ewrên ezmanan
bi quwet û bi bilindahiya mezin
ve bibînin.

---

1 Danîêl 9:27, 11:31; 12:11

2 Leş.

31 Û ew ê milyaketên xwe bi bo-
riya dengbilind ve bişîne û mil-
yaket dê bijartiyên wî ji aliyekê
ezmên heta aliyê wê yî din, ji her
çar bayî ve bicivînin.

### *Zaniyariya ku mirov ji dara hêjîrê bistîne*

Marq 13,28-31; Lûq 21,29-33

32 Lê belê ji dara hêjîrê ve der-
sê bigirin: Wexta ku guliyên wê
nerm dibin û pelikên wê şîn di-
bin, hûn zanin ku havîn nêzîk e.
33 Ûsa wexta ku hûn jî van hemû
tiştan bibînin, bizanibin ku ev tişt
nêzîk e; li ber deriya ye. 34 Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Heta ku
ev hemû tişt çênebin, va nifşeya
derbas nabe. 35 Dê erd û ezman
derbas bibin, lê belê gotinên min
derbas nabin.

### *Roj û saeta ku tenê ji aliyê Xwedê ve tên zanîn*

Marq 13,32-37; Lûq 21,34-36;
Rom 13,11-14; 1.Sel 5,4-8

36 Lê belê di derheqê wê rojê û
saetê de, ne milyaketên ezmanan,
ne jî Law; lê xeynî Bav kesek
tiştekî nizane. 37 Çawa ku di ro-
jên Nûh de bûn, di hatina Lawê
Mirov de jî dê ûsa bibe. 38 Ji ber
çawa ku wan rojên berî tofanê mi-
rovan dixwarin û vedixwarin, di-
zewicîn û mêr dikirin, heta wê roja
ku Nûh kete keştiyê 39 û mirov
pê nehisiyan, heta ku tofan rabû
û hemû xeniqîn; dê hatina Lawê
Mirov jî ûsa be. 40 Wê wextê du
mirov dê li nav zeviyê bin, dê yek
bê girtin û yek bê hiştin. 41 Du
pîrekê li aşê genim dihêrin hebin
û dê yek bê girtin û yek bê hiştin.
42 Ji ber vê yekê, hişyar bimînin;
ji ber hûn nizanin ku, Xudanê we
dê kîjan rojê bê! 43 Lê belê vêya
bizanibin ku, ger xwediyê malê
zanîbûya ku diz kîjan saetê biha-
ta, dê hişyar bimaya û nedihişt ku
mala wî qul bikirina. 44 Bona vê
yekê hûn jî amade bin; ji ber ku
Lawê Mirov di saetekê de bê ku,
hûn ne li bendê ne.
45 Bi wî awayî, ma kî ye ew xu-
lamê dilsoz û baqil ku, efendiyê
wî ew danî ser xulamên xwe,
bona di wextê de xwarina wan
bide wan? 46 Xwezî bi wî xu-
lamî ku, wextê efendiyê wî bê,
wî di xizmetekî ûsa de bibîne!
47 Bi rastî ez ji we re dibêjim:
Dê efendî wî dayne ser hemû
malên xwe. 48 Lê belê ger ew
xulamê xerab di dilê xwe de bêje:
Dê efendiyê min dereng bê 49 û
dest pê bike, li hevalên xwe yên
xulam bixe û tevî yên serxweş
bixwe û vexwe, 50 dê efendiyê
wî xulamî di rojek ûsa de bê ku,
ew ne li benda wî ye û di saetek
ûsa de ku, ew pê nizane. 51 Û dê
wî bike du parî û para wî dê tevî
durûyan bide; li wir dê girî û qir-
çîniya diranan bibe.

### *Wekoka deh qîzên azib*

25 Wê çaxê Serweriya Ez-
manan, dê bibe mîna
deh qîzên azib ku qendîlên xwe
rahiştine û çûne pêşwaziya zavê.
2 Ji wan pênc baqil û pênc bêaqil
bûn. 3 Ji ber gava ku yên bêaqil
qendîlên xwe rahiştin, rûn bi xwe
re negirtin. 4 Lê belê yên baqil,
rûn jî di qaban de tevî qendîlên
xwe bi xwe re girtin. 5 Lê belê
gava ku zava dereng ket, xew ket
ser hemûyan û di xew de çûn.
6 Û nîvê şevê qêrînek hat: A vay,
zava tê! Derkevin pêşiya wî!
7 Wê wextê hemû qîz rabûn û qen-
dîlên xwe amade kirin. 8 Û yên
bêaqil ji yên baqil re gotin: Ji rûnê
xwe bidin me, ji ber ku qendîlên
me ditemirin! 9 Yên baqil bersiv
dan û gotin: Na, dibe ku rûn ji me
û we re têrê neke; ya qenc, hûn
herin cem yên rûn difiroşin û ji bo
xwe bikirin!
10 Û dema ew çûn ku rûn biki-
rin, zava hat û ew qîzên ku amade
bûn, tevî wî ketin dawetê û derî
hate girtin. 11 Paşê qîzên din jî
hatin û gotin: Ya Xudan, ya Xu-
dan, li me veke! 12 Lê belê wî
bersiv da û got: Bi rastî ez ji we re
dibêjim: Ez we nas nakim! 13 Ji
ber vê yekê hişyar bimînin! Ji ber
ku hûn ne bi rojê û ne jî bi saeta
ku Lawê Mirov tê dizanin.

[1] Li rasteka menan binêrin.

### *Telantên ku ji xulaman re hatine dayîn*

Lûq 19,11-27

14 Ji ber ew mîna zilamê ku gava
çû welatekî din, bangî xulamên
xwe bike û malê xwe emanetî wan
bike ye. 15 Wî li gor hunerê wan,
pênc telant[1] da yekî, du telant da ye-
kî û telantek jî da yekî û derkete
rê. 16 Yê ku pênc telant girtibû
hema çû, bi wan danûstendinê kir
û pênc telantên din qezenc kir.
17 Bi vî awayî yê ku du telant gir-
tîbûn jî, duduyên din qezenc kirin.
18 Lê belê yê ku telantek girtîbû,
çû erd kola û pereyê efendiyê xwe
veşart.
19 Û piştî demeke dirêj efendi-
yê wan xulaman hat û tevî wan
hesabê xwe dît. 20 Yê ku pênc
telant girtîbûn, pêş de hat, pênc
telantên din jî anîn û got: Efendî,
te pênc telant dabû min, a vay,
min pênc telantên din jî qezenc
kir. 21 Efendiyê wî jê re got:
Aferîn, xulamê qenc û dilsoz! Tu
di nav tiştên kêm de dilsoz bûyî,
ez ê te deynim ser gellek tiştan;
bikeve şênahiya efendiyê xwe!
22 Yê ku du telant girtîbû jî hat û
got: Efendî, te du telant dabû min,
a vay, min du telantên din jî qe-
zenc kir. 23 Efendiyê wî jê re got:
Aferîn, xulamê qenc û dilsoz! Tu
di nav tiştên kêm de dilsoz bûyî,
ez ê te deynim ser gellek tiştan;
bikeve şênahiya efendiyê xwe!
24 Lê belê yê ku telantek girtîbû

jî hat û got: Efendî, min dizanibû
ku wekî tu mirovekî hişk î û cîhê
ku te neajotiye, tu diçinî û cîhê
ku te belav nekiriye, berhev dikî
25 û ez tirsiyam, çûm û telantê te
di erdê de veşartim; a vay, malê te
ji te re be! 26 Lê belê efendiyê wî
bersiv da û ji wî re got: Xulamê
xerab û zexel! Ma te dizanîbû ku,
ez ji cîhê ku min neajotiye diçi-
nim û cîhê ku, min belav nekiriye,
berhev dikim? 27 Wê çaxê divê
te perê min bida bankêran; gava
ku ez bihatima, min ê pereyê xwe
tevî selefa wî ve bigirta. 28 Ji ber
vê yekê, wî telantî ji wî bigirin û
bidin yê ku deh telantên wî hene!
29 Ji ber ku yê kî hebe, dê jê re bê
dayînê û bê zêde kirin. Lê belê yê
kî tune be, ya ku pê re heye jî dê
jê bê girtin! 30 Û vî xulamê bêkêr
bavêjin tariya derve! Li wê derê
dê bibe girî û qirçîniya diranan.

*Darazkirina Neteweyan*

31 Lê belê wexta ku Lawê Mi-
rov hemû milyaketan pê re û bi
mezinahiya xwe ve bê, hingê dê
li ser texta xwe yî bilind rûne;
32 hemûya gelan dê li ber wî
bicivîn û ew ê wan ji hev û din
veqetîne, çawa ku şivan mîhan ji
bizinan vediqetîne. 33 Dê mîhan
bide milê xwe yî rastê û bizinan
bide milê xwe yî çepê. 34 Wê
wextê Qiral, dê ji yên ku li aliyê
xwe yî rastê ne re bêje: Ya hûn,
pîrozên Bavê min, werin, Serwe-
riya ku ji bona we ji destpêka dinê
ve amade bûye, mêras bigirin!
35 Ji ber ku ez birçî bûm û we
xwarin dan min; ez tî bûm û we av
dan min; ez xerîb bûm û we min
girtin hundir; 36 ez tazî bûm û we
kinc li min kirin; ez nexweş ketim
û we serîdankê li min kirin; ez di
girtîgehê de bûm û hûn hatin cem
min. 37 Wê wextê dê yên salih
bersivê bidin wî û bêjîn: Ya Xu-
dan, ma kengê me te birçî dîtin û
xwarinê da te, an te tî dîtin û av da
te? 38 Û kengê me te xerîb dîtin û
te girtin hundir, an jî te tazî dîtin û
kinc li te kirin? 39 Û kengê me te
nexweş an di girtîgehê de dîtin û
em hatin cem te? 40 Dê Qiral ber-
sivê bide û ji wan re bêje: Bi rastî
ez ji we re dibêjim: Madem ku
we ji van birayên minî herî biçûk
yekî re kir, we ji min re kir!
41 Wê wextê ew, dê ji yên ku li
aliyê xwe yî çepê ne re jî bêje:
Yên lanet lê bûyî! Ji cem min he-
rin nav agirê abadîn ku, ji bona
Îblîs û milyaketên wî amade
bûye! 42 Ji ber ku ez birçî bûm û
we xwarinê nedan min, ez tî bûm
û we avê nedan min; 43 ez xerîb
bûm û we min negirtin hundir; ez
tazî bûm û we kincan li min ne-
kirin, ez nexweş û di girtîgehê de
bûm û hûn nehatin cem min!
44 Wê wextê ew ê jî bersivê bidin
û bêjin: Ya Xudan! Ma kengê me

te birçî, an tî, an xerîb, an tazî, an
nexweş, an jî di girtîgahê de dîtin
û me ji te re xizmetê nekirin?
45 Wê wextê ew ê bersivê bide
wan û bêje: Bi rastî ez ji we re
dibêjim: Madem ku we ji vana
yên herî biçûk yekî re nekir, we ji
min re jî nekirin! 46 Û vana herin
ezabê abadîn, lê belê yên salih dê
herin jiyana abadîn!

XAÇKIRIN Û VEJÎNA ÎSA MESÎH

26 Û wusa bû ku, gava Îsa
hemûyên van gotinan
qedand, ji şagirtên xwe re got:
2 Hûn dizanin ku piştî du rojê Cej-
na Fisihê ye û Lawê Mirov bona bê
xaçkirin dê bi dest ve bête dayîn.

*Bona kuştina Îsa dek û dolabê ava dikin*

Marq 14,1-2; Lûq 22,1-2; Yû 11,45-53

3 Wê wextê serokên kahînan û ka-
lepîrên gel di hewşa Serokkahîn de
ku, navê wî Qayafa bû civiyan. 4 Û
bi hev re şêwirîn ku Îsa bi hîle bigi-
rin û bikujin. 5 Lê belê wana digot:
Bila ev kar di vê cejnê de nebe ku,
di nav gel de tevlihevî nebe!

*Mînaka dilsoziya qenc*

Marq 14,3-9; Yû 12,1-8

6 Û gava Îsa li Beytanyayê di mala
Şimûnê bicizam de bû, 7 pîrekek
di qabekî mermerê sipî de, bi rûnê
zehf bêhnxweş ve hat cem wî û
gava ew li sifrê rûniştîbû, pîrekê
rûn bi ser serê wî ve rijand. 8 Lê
belê gava şagirtan ev yek dîtin,
hêrs bûn û gotin: Ma ji bona çi ev
destbelavî kirin? 9 Ji ber hewce bû
ku, ev rûn bi qîmetekî giranbuha
bihata firotin û wê bidana xizanan!
10 Lê belê Îsa bi vê dizanîbû û ji
wan re got: Ma çima hûn pîrekê
diêşînin? Ji ber ku wê karekî qenc
ji min re kir! 11 Ji ber ku dê xizan
her tim li cem we bin, lê belê ez
ê her tim ne li cem we bim. 12 Ji
ber ku pîrekê ev rûnê bêhnxweş
bi ser bedena min ve rijand ku,
min ji bo binaxkirinê amade bike.
13 Bi rastî ez ji we re dibêjim: Ev
Mizgînî di dinê de, li ku derê bê
danasîn kirin, dê kirina vê pîreka
jî ji bona bîranîna wê bête gotin!

*Xayîntiya Cihûda*

Marq 14,10-11; Lûq 22,3-6

14 Wê wextê yek ji Donzdehan ku,
ji wî re digotin Cihûdayê Îsxeryotî,
çû cem serokên kahînan 15 û got:
Ger ez wî bidim destê we, hûn ê çi
bidin min? Wan jî sî zîv jê re soz
dan ku, bidin wî. 16 Bona ku Îsa
bide dest, ew ji wê wextê ve li fer-
sendê digeriya.

*Xwarina Fisihê*

Marq 14,12-21; Lûq 22,7-18; 22,21-23;
Yû 13,1-30

17 Di roja yekemîn ya Cejna Nanê
Bêhavên de, şagirt hatin cem Îsa û
jê re gotin: Tu li ku derê dixwazî,

xwarina Fisihê bixwî ku, em ji te
re amade bikin? 18 Wî jî got: He-
rin bajêr, li cem filan mirovî û ji
wî re bêjin: Mamoste dibêje, wex-
ta min nêzîk e; ez ê tevî şagirtên
xwe di mala te de Fisihê pîroz
bikim! 19 Û şagirtan çawa ku Îsa
ji wan re emir dabû, ûsa kirin û
xwarina Fisihê amade kirin.
20 Gava ku êvar bû, ew tevî her
donzdeh şagirtên xwe li sifrê rûnişt.
21 Gava ku wan hîn xwarinê di-
xwarin, Îsa got: Bi rastî ez ji we re
dibêjim: Yekî ji we dê min bide dest!
22 Û ew jî gellekî xemgîn bûn û her
yekî ji wan ji wî re got: Ya Xudan,
ma ez im? 23 Wî bersiv da wan û got:
Yê ku pariyê xwe tevî min, di feraxa
xwarinê de dakir, ew e yê ku dê min
bide dest. 24 Jixwe Lawê Mirov, li
gor ku bona wî hatiye nivîsîn diçe,
lê belê wey li serê wî mirovî ku, dê
Lawê Mirov bi navgîniya wî, bi dest
ve tête dayîn! Ger ew mirov nebûba,
dê jê re qenctir biba. 25 Cihûdayê
ku ew da dest, bersiv da û got: Ya
Mamoste! Ma ez im? Îsa jî ji wî re
got: Mîna gotina te ye!

*Sifra ku Îsa amade kir:*
*Nan û xemra wekokî*

Marq 14,22-26; Lûq 22,15-20; 1.Kor 1,23-29

26 Gava wan nan dixwarin, Îsa nan
rahişt, dua şikiriyê kir, ew şikand[1],
da şagirtan û got: Bigirin, bixwin!
Ev bedena min e. 27 Û kaseyek[2]
rahişt, şikir kir û da wan û ji wan
re got: Hûn hemû ji vê vexwin!
28 Ji ber ku ev xwîna mina Pey-
manê ye ku, ji bo bexşandina gu-
nehên gellekan dê bête rijandin.
29 Lê belê ez ji we re dibêjim: Êdî
ez tu carî ji bera mêwa rez vena-
xwim; heta wê roja ku ez ê tevî
we, di Serweriya Bavê xwe de ya
nû vexwim! 30 Û wan qesîdekê
gotin, derketin Çiyayê Zeytûnê.

*Îsa ji bo înkarkirina Pêtrûs dibêje*

Marq 14,27-31; Lûq 22,31-34;
Yû 13,36-38

31 Wê wextê Îsa ji wan re got:
Îşev hûn ê hemû ji min tilpekî bi-
bin; ji ber ku hatiye nivîsîn: Ez ê
li şivan xînim û dê mîhên keriyê
belav bibin[3]. 32 Lê belê piştî ku
ez ji mirinê rabim, ez ê berî we
herim Celîlê. 33 Lê belê Pêtrûs
bersiv da û ji wî re got: Ger hemû
di te de tilpekî bibin jî, ez qet til-
pekî nabim!
34 Îsa ji wî re got: Bi rastî ez ji te
re dibêjim: Îşev hîn berî bang kiri-
na dîk, tuyê sê carî min înkar bikî!
35 Pêtrûs ji wî re got: Ger hewce
bike, ez ê tevî te bimirim jî, dîsa
ez te qet înkar nakim! Hemûya
şagirtan jî ûsa gotin.

---

*1* Parî kir, an jî: Perçe kir.
*2* Kasik.
*3* Zekerya 13:7

*Îsa li Gêtşêmaniyê dua dike*

Marq 14,32-42; Lûq 22,39-46

36 Wê wextê Îsa tevî wan çû
cîhekî ku, navê wê Gêtşêmanî
bû û ji şagirtên xwe re got: Li
vir rûnin, heta ku ez herim û li
wê derê dua bikim! 37 Û Pêtrûs
û herdu lawên Zebedî bi xwe
re girt û dest pê kir, xemgîn û
zehf teng bû. 38 Wê wextê ji
wan re got: Canê min di dereca
mirinê de zehf xemgîn e; hûn li
vir bisekinin û li tev min hişyar
bimînin! 39 Hinekî pêş ve çû û
ket ser rûyê xwe, dua kir û got:
Bavê min! Ger mimkun be, bila
ev kase ji min derbas bibe; lê belê
ne mîna xwestina min, bila mîna
xwestina te bibe! 40 Û ew hate
cem şagirtan û wan di xew de dît
û ji Pêtrûs re got: Ma qene we
nikaribûn bi min re saetekê hişyar
bimana? 41 Hişyar bimînin û dua
bikin ku, hûn neyên ceribandin!
Her wekî ruh dilxwaz e, lê belê
beden bêquwet e. 42 Îsa cara
duwemîn çû, dua kir û got: Bavê
min! Ger heta ku ez wê venexwim,
derbasbûna wê mimkun nabe,
bila xwestina te bibe! 43 Û dema
ew hat, dîsa wan di xew de dît;
ji ber ku çavên wan giran bûbûn.
44 Wan di cîh de hişt, dîsa dûr
ket, cara sêwemîn dua kir û dîsa
wan gotinan got. 45 Wê wextê
Îsa hate cem şagirtan û ji wan re
got: Êdî di xew de biçin û rehet
bikin; a vay, saet nêzîk bû û Lawê
Mirov bi destê gunehkaran ve tête
dayîn. 46 Rabin, em herin! A vay,
yê ku min dide dest, nêzîk bû.

*Îsa tê girtin*

Marq 14,43-50; Lûq 22,47-53;
Yû 18,3-12

47 Îsa hîn diaxifî, a vay, Cihûdayê
ku yek ji Donzdehan bû hat, tevî
wî komekî mezin ya mirovan bi
dar û şûran ve ku, ji aliyê serokên
kahînan û kalepîrên gel ve ha-
tibûn şandin, hebû. 48 Û yê ku ew
da dest, nîşanek dabû wan û go-
tibû: Ez kîjanî ramûsînim, ew e,
bi wî bigrin! 49 Ew hema nêzîkî
Îsa bû û got: Silav ji te re Mamos-
te! û wî ramûsand. 50 Îsa jî ji wî
re got: Heval, ma tu bona çi hatî?
Li ser vêya ew nêzîk bûn, dest
dan ser Îsa û pê girtin. 51 A vay,
yek ji ewên ku tevî Îsa bûn, dest
avêt şûrê xwe kişand û li xulamê
Serokkahîn xist û guhê wî jêkir.
52 Wê wextê Îsa ji wî re got: Şûrê
xwe dîsa bike cîhê wê! Ji ber ku
hemûyên ku şûr dikişînin, dê bi
şûr ve bimirin! 53 An jî tu dibêjî,
ma qey ez nikarim ji Bavê xwe
lava bikim û ew jî aniha ji donz-
deh lejyonan[1] zêdetir milyaket na-
gihîne min? 54 Lê belê nivîsên ku

[1] Liqeq leşkerî ya Romiyan; bi texmînî qasî 6000 leşker e.

dibêjin, divê hemû ûsa bibin, dê
çawa bêne cîh?
55 Wê saetê Îsa ji ajaweyê re got:
Mîna rabûna li hember rêbirekî
bi şûran û daran, ma hûn ji bona
girtina min hatine? Ez her roj di
Perestgehê de rûdiniştim û min
we hîn dikir, we bi min nedigirtin.
56 Lê belê hemûyên vana bûn ku,
nivîsên peyxamberan bêne cîh.
Wê wextê hemû şagirtan wî di cîh
de hiştin û reviyan.

*Îsa li ber Civata Netewî*

Marq 14,53-65; Lûq 22,54; 22,63-71;
Yû 18,12-13; 18,19-24

57 Yên ku bi Îsa girtibûn, wî
birin cem Serokkahîn Qayafa;
alimên zagonê û kalepîran li wir
civiyabûn. 58 Pêtrûs ji dûr ve heta
hewşa Serokkahîn li pey wî çû û
kete hundir tevî nobedaran rûnişt,
bona ku dawiyê bibîne.
59 Serokên kahînan û hemûya Ci-
vata Netewî, ji bona ku Îsa biku-
jin, li dijî wî li şahdeyên derewîn
digeriyan. 60 Û her wekî gellek
şahdeyên derewîn hatin jî, lê dîsa
jî ya ku lê digeriyan nedîtin[1].
61 Lê belê di dawiyê de du
şahdeyên derewîn hatin û gotin: Vî
mirovî got: Ez dikarim, Perestgeha
Xwedê xera bikim û di nav sê ro-
jan de dîsa wê çêbikim! 62 Û Se-
rokkahîn rabû û ji Îsa re got: Ma tu
qet bersivê nadî? Ev çi şahdeyiye
ku vana li dijî te dikin? 63 Lê belê
Îsa bêdeng ma. Û Serokkahîn ji wî
re got: Ez te li cem Xwedayê zin-
dî didim sondê, ger Lawê Xwedê,
Mesîh tu yî, ji me re bêje!
64 Îsa jî ji wî re got: Mîna ku
te gotiye yî! Lê belê ez ji we re
dibêjim: Ji niha pê ve hûn ê bi-
bînin ku, Lawê Mirov, li aliyê
rast, yê Qudretê rûniştiye û li ser
ewrên ezmanan ve tê!
65 Wê wextê Serokkahîn kincên
xwe çirand û got: Wî kufr kir!
Êdî çi hewcedariya me ji şahidan
re heye? A vay, we niha kufriyên
wî bihîstin. 66 Ma hûn çi dibêjin?
Wan bersiv dan û gotin: Wî mi-
rinê li xwe heq kir! 67 Wê gavê
tifî[2] rûyê wî kirin û bi kulmikan li
wî xistin; hinekan jî şîrmaq lê di-
dan 68 û digotin: Ya Mesîh, ma yê
ku li te dixe kî ye? Peyxambertiyê
ji me re bike!

*Înkarkirina Pêtrûs*

Marq 14,66; Lûq 22,54-62;
Yû 18,15-18; 25-27

69 Pêtrûs li derve, di hewşê de
rûniştî bû. Û keçika xizmetkar
hat cem wî û got: Tu jî tevî Îsayê
Celîlî bû! 70 Lê wî li ber hemû-
yan înkar kir û got: Ez nizanim ku
tu çi dibêjî. 71 Dema ku ew derket
ber derî, keçikek din ya xizmetkar

*1* Yanê dîsa jî li yê ku lê digeriyan, nedîtin.

*2* Tûyî.

wî dît û ji yên ku li wê derê ne re
got: Ev mirov jî bi Îsayê Nisretî
re bû! 72 Û wî dîsa bi sondê înkar
kir û got: Ez wî mirovî nas nakim!
73 Û hineke pişt re yên ku li wir
bûn, çûn cem Pêtrûs û gotin: Bi
rastî tu jî ji wan î; ji ber ku axafti-
na te, te eşkere dike! 74 Wê wextê
wî lanet li xwe kir, sond xwar û
got: Ez wî mirovî nas nakim! Û
hema dîk uriya[1]. 75 Pêtrûs ew go-
tina Îsa anî bîra xwe ku, ji wî re
gotibû: Berî ku dîk biure[2], tuyê sê
caran min înkar bikî. Û ew derket
derve û bi êş û jan giriya.

*Li ber Walî Pîlato*

Marq 15,1; Lûq 23,1-2; Yû 18,28-32

27 Gava bû sibe, hemûyên se-
rokên kahînan û kalepîrên
netewê bona ku Îsa bikujin, li dijî
wî bi hev re şêwirîn. 2 Û Îsa girê-
dan, birin û dan destê walî, Ponti-
yûs Pîlato.

*Cihûda poşman dibe û xwe dadiliqîne*

K.Şa 1,16-20

3 Wê wextê Cihûdayê ku wî da
dest, bi dîtina mehkûm kirina wî,
poşman bû, wî sî zîvî ji serokên
kahînan û kalepîran re şunda ve-
gerand û got: 4 Min bi dest dayî-
na xwîna bêsûc guneh kir! Lê belê
wan got: Çi têkiliya vêya bi me re
heye? Here, tu li çareseriya xwe bi-
nihêre! 5 Û Cihûda zîv avêtin nav
Perestgehê, derket û çû û xwe dali-
qand. 6 Serokên kahînan zîv girtin
û gotin: Ne rast e ku, em wan têxin
nava xezîna Perestgehê, ji ber ku
ew buha xwînê ye!
7 Û ew bi hev re şêwirîn û ji bo
gorên xerîban bi wan zeviya Kû-
zikvan stendin. 8 Ji ber vê yekê
ji wê zeviyê re, heta îro: Zeviya
xwînê tê gotin. 9 Wê wextê ew
gotina ku, bi navgîniya Yêrem-
ya peyxamber ve hatiye gotin,
hate cîh: Wan sî zîv qîmet sten-
din, çawa ku ji lawên Îsraêlê hin
kesên ji bo wî qayîl bûn 10 û ew
ji bo stendina zeviya Kûzikvanê
dan,[3] çawa ku Xudan ji min re
emir kiribû.

*Pîlato Îsa dikişîne pirsiyariyê*

Marq 15,2-5; Lûq 23,3-5; Yû 18,33-38

11 Û Îsa li ber walî sekinî, walî
ji wî pirsiya û got: Ma tu qiralê
Cihûdan î? Îsa ji wî re got: Mîna
gotina te ye! 12 Lê belê gava ku
serokên kahînan û kalepîran ew
sûcdar kirin, wî qet bersiv neda.
13 Wê wextê Pîlato ji wî re got:
Ma tu nabihîzî ku, bi çiqas tiştî li
dijî te şahdeyiyê dikin? 14 Îsa bi
gotinekî jî bersiv neda wî; ûsa ku
walî zehf ecêb ma.

---

[1] Dîk bang da, bang kir.
[2] Berî ku dîk bang bide.

[3] Zekerya 11:12-13

*Daraziya mirinê didin Îsa*

Marq 15,6-15; Lûq 23,13-25;
Yû 18,39-19,16

15 Û adeta walî bû ku, di cejnê de
mehkûmekî ku gel dixweze berde.
16 Wê wextê mehkûmekî wanî
navdar bi navê Barabas hebû.
17 Gava ku ew civiyan, Pîlato ji
wan re got: Hûn kîjanî dixwazin
ku, ez ji we re berdim, Barabas, an
Îsa, yê ku jê re Mesîh tête gotin?
18 Ji ber wî zanîbû ku, ji hesûdi-
yan re Îsa dane dest. 19 Û gava ku
Pîlato li ser kursiya dadrês rûniştî
bû, jina wî xeber şand û got: Tu
tiştekî bi wî mirovê rast ve meke,
ji ber ku min îro ji bona wî, di
xewnê de gellek tengasî kişand!
20 Lê belê serokên kahînan û ka-
lepîran gel xapandin ku, berdana
Barabas û kuştina Îsa bixwazin.
21 Û walî bersiv da û ji wan re
got: Hûn ji van herduyan kîjanî
dixwazin ku, ez ji we re berdim?
Wan jî gotin: Barabas! 22 Pîlato
ji wan re got: Ma ez Îsayê ku jê
re Mesîh dibêjin, çi bikim? Wan
hemûyan gotin: Bila bê xaçkirin!
23 Û Pîlato ji wan re got: Ma wî
çi xerabî kiriye? Lê belê wan hîn
zêde kirin qêrîn û gotin: Bila bê
xaçkirin! 24 Gava Pîlato dît ku,
ew nikare qet tiştekî bike, lê belê
hîn jî zêde dest bi tevliheviyê di-
kin, avê rahişt, li ber gel destê xwe
şuşt û got: Ez ji xwîna vî mirovê
salih bêsûc im; hûn vêya bifikirin!
25 Hemûya gel bersiv dan û gotin:
Bila xwîna wî li ser me û li ser za-
rokên me be! 26 Wê wextê Pîlato
Barabas ji wan re serbest berda; lê
belê piştî ku Îsa da ber qamçiyan,
da wan ku bê xaçkirin.

*Leşker qerfên xwe bi Îsa ve dikin*

Marq 15,16-20; Yû 19,1-5

27 Wê gavê leşkerên walî Îsa
girtin hundirê qesrê û hemûya
civakê li ser wî civandin. 28 Wî
tazî kirin û xeftanekî sor lê kirin.
29 Û tacek ji stiriyan vegirtin, dan
serê wî û qamîşek jî dan destê wî
yê rastê; li ber wî çok dan, qerfên
xwe pê kirin û gotin: Silav, ya qi-
ralê Cihûdan! 30 Tûyî ser wî ki-
rin, qamîş girtin û li serê wî xistin.
31 Û piştî ku qerfên xwe bi wî
kirin, xeftan ji wî kirin û kincên
wî lêkirin û bona ku xaç bikin, wî
birin.

*Xaçkirina Îsa*

Marq 15,21-32; Lûq 23,26-43;
Yû 19,17-27

32 Û gava derketin derve, wan zi-
lamekî Kûrêneyî, bi navê Şîmûn
ve dîtin; bona ku xaça Îsa bikişîne,
wî kirin suxrekar. 33 Gava ew ha-
tin wê derê ku, jê re digotin Gol-
gota; ku tê mana: Hestiyê serî;
34 bona ku vexwe xemr û zira-
vika tevlihevkirî danê û gava Îsa
ew tam kir, nexwest ku vexwe.
35 Piştî ku wan wî xaç kirin, li ser

kincên wî vijang avêtin û wan di
nava hev de par kirin. 36 Û li wê
derê rûniştin û nobedarî li wî ki-
rin. 37 Û nivîsa sûcê wî, danîn ser
serê wî: EV QIRALÊ CIHÛDAN
ÎSA YE. 38 Wê wextê du rêbir jî
bi wî re, hatin xaçkirin; yek li ali-
yê wî yê rastê û yek jî li aliyê wî
yê çepê.
39 Û yên ku ji wê derê ve derbas
dibûn, kufrê li wî dikirin, serê xwe
ji wî re kil dikirin 40 û digotin:
Kanê te Perestgehê xera dikir û di
sê rojan de çêdikir! De xwe xelas
bike, ger tu Lawê Xwedê yî, ji
xaçê ve dakeve jêr! 41 Bi vî awayî
serokên kahînan jî, tevî alimên
zagonê û kalepîran qerfên xwe bi
wî dikirin û digotin: 42 Kesên din
xelas kir, nikare xwe xelas bike!
Ew Qiralê Îsraêlê ye! Bila niha ji
xaçê ve peya be û em ê baweriyê
bi wî bînin! 43 Baweriya xwe bi
Xwedê anîbû; ger Xwedê ji wî hez
dike, bila niha wî xelas bike; ji ber
ku wî digot: Ez Lawê Xwedê me!
44 Rêbirên ku tevî wî hatibûn
xaçkirin jî ûsa wî biçûk didîtin.

*Mirina Îsa*

Marq 15,33-41; Lûq 23,44-49;
Yû 19,28-30

45 Û ji saeta şeşan heta saeta ne-
han tariyek ket ser hemûya erdê.
46 Û nêzîkî saeta nehan, Îsa bi
dengekî bilind kir qêrîn û got:
Êlî, Êlî! Lama sabaxtanî? Yanê:
Xwedayê min! Xwedayê min!
Ma te çima min berda[1]? 47 Gava
hinekên ji yên ku li wir sekinîbûn
vêya bihîstin, gotin: Ew bangî
Êlyas dike!
48 Û yek ji wan hema bazda, sîn-
gerek anî di sîrkê de dakir, li ser
qamîşekê ve kir û da wî ku, vex-
we. 49 Lê belê hinekên din gotin:
Bihêle, em bibînin, ka dê Êlyas
bê û wî xelas bike? 50 Û Îsa, dîsa
bi dengekî bilind qêriya û ruh da.
51 Û a vay, perda Perestgehê ji
sêrî heta binî çiriya, bû du parî û
erd hejiya û zinar qelişîn, 52 gor
vebûn û gellek cesedê miriyên
pîroz rabûn. 53 Ew ji goran derke-
tin û li pey vejîna Îsa çûn Bajarê
Pîroz û ji gellekan re xuya bûn.
54 Gava sersed û yên ku tevî wî
nobedariya Îsa dikirin, erdhejînê
û ew hemû tiştên qewimî dîtin,
gellekî tirsiyan û gotin: Bi rastî ev
Lawê Xwedê bû!
55 Û li wê derê gellek jin hebûn
ku, ji dûr ve temaşe dikirin; ew
ji Celîlê li pey Îsa hatibûn, xiz-
met ji wî re kiribûn; 56 Meryema
Mejdelanî, Meryema diya Aqûp û
Yoses û diya lawên Zebedî di nav
wan de bûn.

[1] Ma te çima dev ji min berda, an jî: Ma te çima ez berdam. Zebûr 22:1

*Binaxkirina Îsa*

Marq 15,42-47; Lûq 23,50-56;
Yû 19,38-42

57 Gava bû êvar, mirovekî dewle-
mend ji Erîmetiyê hat ku, navê wî
Ûsiv bû; ew jî ji şagirtên Îsa bû.
58 Ev zilam çû cem Pîlato û cese-
dê Îsa ji wî xwest. Wê gavê Pîla-
to destûr da ku, cesed bê dayîn.
59 Ûsiv cesed girt, wê bi cawekî
paqij yê ketenî ve pêça 60 û ew
danî nava gora xwe, ya ku wî nû
di zinarê de kola bû û wî kevirekî
mezin gindirand ber derê gorê û çû.
61 Meryema Mejdelanî û Mer-
yema din li wê derê, li hemberî
gorê rûniştîbûn.

*Nobedar bona parastina tirbê tên wezîfedar kirin*

62 Û roja din ku piştî roja Ama-
dekirinê bû, serokên kahînan û
Fêrisiyan li cem Pîlato civiyan
63 û gotin: Efendî, tê bîra me ku,
wexta ew xapînok hîn zindî bû,
digot: Ez ê piştî sê rojî bivejim.
64 Niha emir bide ku, heta roja
sisiyan nobedariyê li gorê bikin,
nebe ku şagirtên wî bên, wî bidi-
zin û ji gel re bêjin: Ew ji nav mi-
riyan rabûye! Û rêşaşiya paşiyê,
ji ya pêşiyê xerabtir be. 65 Pîlato
ji wan re got: Leşkerên parêzker
yên we hene; herin û mîna ku hûn
dizanin, ewledar bikin! 66 Û ew
bi leşkerên parezker ve çûn kevir
mor kirin û gorê ewledar kirin.

*Vejîna Îsa*

Marq 16,1-10; Lûq 24,1-12; Yû 20,1-10

28 Û piştî Sebtê, ber ve roja
yekem ya hefteyê de, di
dema dest pê kirina berbangê de,
Meryema Mejdelanî û Meryema
din hatin ku li gorê binihêrin.
2 Û a vay, erdhejîneke mezin
bû; ji ber ku milyaketekî Xu-
dan ji ezmanan hate xwarê û hat
kevir gindirand û li ser rûnişt.
3 Xuyabûna wî mîna birûskê bû
û kincên wî mîna berfa sipî bûn.
4 Nobedar ji tirsa wî lerizîn û bûn
mîna miriyan. 5 Û milyaket ber-
siv da û ji jinan re got: Hûn me-
tirsin! Ji ber ez dizanim ku hûn
li Îsayê ku hatibû xaçkirin dige-
rin. 6 Ew ne li vir e; ji ber ku ew
rabûye, mîna ku wî gotîbû. Werin,
ew cîhê ku Xudan razayîbû, bi-
bînin! 7 Û zû herin, ji şagirtên wî
re bêjin: Ew ji nav miriyan rabûye
û a vay, ew berî we diçe Celîlê û li
wir hûn ê wî bibînin. A vay, min ji
we re got! 8 Jin bi tirs û şabûneke
mezin hema ji gorê çûn, reviyan
ku ji şagirtan re bêjin. 9 Û a vay,
di wê demê de Îsa rastî wan hat û
got: Silav ji we re! Ew jî nêzîkî
wî bûn, xwe avêtin lingên Îsa û
ji wî re secde kirin. 10 Wê wextê
Îsa ji wan re got: Metirsin; herin
û ji birayên min re bêjin ku, bila
ew biçin Celîlê û ew ê li wir min
bibînin!

*Bertîlê didin nobedaran*

11 Wexta ku ew diçûn, a vay, hin-
ek ji leşkerên nobedar hatin ba-
jêr û hemû tiştên bûyî ji serokên
kahînan re gotin. 12 Û piştî ku ew
tevî kalepîran civiyan û şêwirîn,
zehf pere dan leşkeran û gotin:
13 Bêjin, şagirtên wî şev hatin û
gava ku em di xew de bûn, ew
dizîn. 14 Û ger ev xeber bigihêje
guhê walî, em ê wî bixapînin
û em nahêlin tu zirar bê we.
15 Wan jî pere girtin û çawa ku
ji wan re hatibû hînkirin, kirin. Û
ev gotin di nav Cihûdan de heta
îroj belav bûye.

*Îsa xuyayî Şagirtên xwe dibe*

Marq 16,14-18; Lûq 24,36-49;
Yû 20,19-23; K.Şa 1,6-8

16 Lê belê yanzdeh şagirt çûn
Celîlê, çiyayê ku Îsa ji wan re go-
tibû. 17 Û gava ku Îsa dîtin, jê re
secde kirin; lê belê hinekan şik ki-
rin. 18 Îsa hat cem wan û bi wan
re axifî û got: Hemû rayedariya ez-
man û erdê ji min re hatiye dayîn.
19 Niha hûn herin, hemû netewe-
yan bikin şagirt[1] û wan bi navê Bav
û Law û Ruhê Pîroz ve vaftîz bikin
20 û bi girtina hemû tiştên ku min
ji we re emir kirine hînî wan bikin.
Û a vay, ez hemûya rojan, heta da-
wiya dinê bi we re me!

[1] An jî: Bikin şagirtên min.

# MIZGÎNIYA ÎSA MESÎH LI GOR MARQOS

## MESÎHÊ XWEDÊ: YÊ XIZMETÊ PÊŞKÊŞÎ MIROVAN DIKE

*Pêşgotin*

Di vê pirtûka ku, P.Z (paşî bûyîna Îsa Mesîh) di salên 55-60'an de hatiye nivîsandin, navê nivîskarê wê derbas nabe. Bi pirranî tê zanîn ku, Yûhena yê bi navê Marqos jî tê zanîn nivîsandiye (K.Şa. 12:25). Marqos, bi navdîtiya şagirt Pêtrûs ve bû alîgirtê (bawerkirê) Mesîh (1.Pet. 5:13). Navê diya wî Meryem bû; bawerkirên pêşîn, bona duakirinê, li mala wî diciviyan (K.Şa. 12:12). Marqos, tevî Pawlos û Barnaba, derket gera yekemîn ya Nûçeyê (K.Şa. 12:25; 13:5).

Mîna ku li gellek cîhê nivîsê de tê dîtin; Marqos, jiyan û karên Îsa Mesîh ûsa nivîsandiye ku, vana mîna xizmetek bi rayedariyekî biryar û xizmetek bê sekin hatine kirin dide daxuyanîkirin. Rayedariya wî di hînkariya wî de, di cinqewirandina wî de, di bihurandina gunehan de tê dîtin. Dema bûyeran geş dibin, bawerkirên wî, hîn jî qenc ji Îsa fêhm dikin. Lê neyariya yên li hemberê wî di berxwe didin jî zêde dibe. Marqos, qala nozdeh mûcîzetên Îsa dike û cîhek ji hînkariya wî zêdetir dide wan. Mirov dikare vê nivîsa bi vî awayî kurt bike:

1. Bûyerên amadekariyê 1:1-13
2. Xizmeta berî Celîlê 1:14-7:23
3. Serîdana Sûr û Sayda 7:24-30
4. Li Celîla başûr xizmet û hînkirin 7:31-9:50
5. Dawiya xizmeta li Cihûstanê û aliyê Çemê Urdunê, rêvîtiya Orşelîmê 10:1-52
6. Bûyerên di derheqê xaçkirin û vejîna Îsa de 11-16:8
7. Eşkerekirina Îsa yê hatiye vejandin û bilindbûna wî yî ezmanan 16:9-20

## BÛYERÊN BERÎ XIZMETA GEL

*Hatina Yehyayê vaftîzkar*
Met 3,1-Lûq 3,1-18; Yû 1,19-28

1 Destpêka Mizgîniya[1] Lawê
Xwedê Îsa Mesîh. 2 Mîna ku
di Îşaya peyxamber de hatiye ni-
vîsandin: A vay, ez nûçevanê xwe
li ber rûyê te ve dişînim; ew ê rêya
te amade bike[2]. 3 Dengê ku ji çolê
ve bang dike: Rêya Xudan amade
bikin, rêyên wî rast bikin[3]!
4 Û bi vî awayî Yehyayê ku li çolê
vaftîzê dikir û bona bexşandina
gunehan waza vaftîz a tobê di-
kir, hat. 5 Hemû gelê Cihûstanê û
hemûya Orşelîmiyan dihatin cem
wî, li gunehên xwe mukur dihatin
û ji aliyê wî ve di Çemê Urdunê de
vaftîz dibûn. 6 Yehya pirça devê li
xwe kiribû û li pişta wî şûtika çer-
mîn hebû û wî kulî û hungivê bejî
dixwar. 7 Û wî waz dida û digot:
Li pey min, yê ji min xurttir e tê
û ez ne liyaq im ku xwar bibim û
benikê pêlavên wî vekim. 8 Min
we bi avê ve vaftîz kir, lê belê ew
ê we bi Ruhê Pîroz vaftîz bike.

*Vaftîz û ceribandina Îsa Mesîh*
Mat 3,13-17; 4,1-11; Lûq 3,21-22; 4,1-13

9 Û di wan rojan de wusa bû ku,
Îsa ji Celîlê, ji bajarê Nisretê hat û
ji aliyê Yehya ve di Çemê Urdunê
de vaftîz bû. 10 Û dema ku ji avê
derket, wî hema dît ku ezman qelişî
û Ruh mîna kevokekê daket ser
wî. 11 Û ji ezmanan dengek hat:
Tu lawê min ê xoşewîst î, ez ji te
razî me! 12 Û Ruh hema ew şand
çolê. 13 Û ew çel roj li çolê ma û ji
aliyê Îblîs ve hat ceribandin; ew bi
heywanên hov re bû û milyaketan
jî ji wî re xizmetê dikirin.

*Îsa bangî çar masîvanî dike*
Met 4,12-22; Lûq 4,14-15; 5,1-13

14 Li pey girtina Yehya, Îsa bi
waz dana Mizgîniya Serweriya
Xwedê hat Celîlê û got: 15 Wext
temam bû û Serweriya Xwedê[4]
nêzîk e. Tobe bikin û bi Mizgînê
bawer bikin!
16 Dema ew ji qeraxa Gola Celîlê
derbas dibû, wî dît ku Şîmûn û bi-
rayê wî Andrêyas tora xwe diavêtin
nava golê; ji ber ku ew masîgir
bûn. 17 Û Îsa ji wan re got: Li pey
min werin, ez ê we bikim nêçîr-
vanên mirovan! 18 Wan jî hema
torên xwe berdan û li pey wî çûn.
19 Û gava ku ew ji wir hinekî pêşve
çû, lawê Zebedî Aqûp û birayê wî
Yûhana dît; wan di lotkê[5] de torên
xwe pîne dikirin[6]. 20 Hema bangî
wan kir; wan jî bavên xwe Zebedî,
tevî karkeran di lotkê de hiştin û li
pey wî çûn.

[1] Di maneya agahiya qenc, Încîlê de ye.
[2] Maleyaxî 3:1
[3] Îşaya 40:3
[4] Qiraletî.
[5] Qayix.
[6] Diselihandin.

*Îsa ruhên xerab diqewirîne*
*û nexweşan baş dike*

Mat 8,14-17; Lûq 4,31-44

21 Û ew hatin Kefernahûmê û Îsa
roja Sebtê hema ket kenîştê û dest
bi hînkirinê kir. 22 Û ew bi hînki-
rina wî pirr ecêb man; ji ber ku wî
ne mîna alimên zagonê[1], lê belê
mîna yekî rayedar hînî wan dikir.
23 Û di kenîşta wan de zilamekî
bi ruhê xerab ve hebû, ew qêriya
24 û got: Ya Îsayê Nisrêtî; tu çi ji
me dixwazî? Ma qey tu bona he-
laq kirina me hatiye? Ez dizanim
tu kî yî: Tu Pîrozê Xwedê yî!
25 Lê belê Îsa ew azirand û jê
re got: Hiş be û ji wî derkeve!
26 Ruhê xerab jî ew hejand û bi
avêtina qêrînên mezin ji wî der-
ket. 27 Hemû jî ewqas şaş û metal
man ku, ji hev û din pirsîn û digo-
tin: Ev çi ye? Ma ev çawa hînkari-
yek nû ye? Ew dikare bi rayedari-
yê emir bide ruhên xerab û ew jî
jê re îtaet dikin! 28 Û nûçeyên di
derheqê wî de, hema li her derê
Celîlê belav bûn.
29 Gava ku ew ji kenîştê derke-
tin, bi Aqûp û Yûhena re hema
hatin mala Şîmûn û Andrêyas.
30 Xwesiya Şîmûn, di nava tayê
nexweşiyê de radiket û ji bo wê
hema ji Îsa re gotin. 31 Ew jî hat
û bi destê wê ve girt, rakir; tayê
dev ji wê berda û pîrekê ji wan
re xizmet kir. 32 Dema bû êvar
û roj çû ava, hemû nexweşan û
yên bindestê cinan anîn cem wî.
33 Hemû gelên bajêr li ber derî
civiya bûn. 34 Îsa gellek kesên
cûr bi cûr nexweşiyan ketine,
baş kir; gellek cin qewirand û
nedihişt ku cin biaxifin; ji ber ku
wan wî nas dikir.
35 Sibehê, gellekî berî hilatina
rojê Îsa rabû; derket û çû cîhekî
tenha, li wir dua kir. 36 Şîmûn
û kesên pê re li pey Îsa çûn
37 û gava ku wan wî dîtin, ji wî re
gotin: Her kes li te digere! 38 Îsa
jî ji wan re got: Em herin bajarên
nêzîkî vir ku, ez li wan deran jî
wazê bidim; ji ber ku ez ji bo vê
yekê hatim! 39 Û di kenîştên wan
de bi waz dayînê û bi cinan qe-
wirandinê ve li hemûya herêma
Celîlê geriya.

*Îsa yekî bi cizam baş dike*

Met 8,1-4; Lûq 5,12-16

40 Û yekî bi cizam hate cem Îsa û li
ber wî geriya, çok da û ji wî re got:
Ger tu bixwazî, tu dikarî min paqij
bikî! 41 Dilê Îsa bi wî şewitî û des-
tê xwe dirêjî wî kir, pê da û ji wî
re got: Dixwazim, paqij bibe! 42 Û
gava ew diaxifî hema cizam jê çû
û ew paqij bû. 43 Îsa wî zehf îkaz
kir, hema ew şand û ji wî re got:
44 Hay ji xwe hebe, ji tu kesekî re
tiştekî nebêje; lê biçe, xwe nîşanî

1 Alimên ku kitêbên pîroz berhev dikin, şîrove dikin û bikar tînin.

kahîn[1] bide û bona ku ji wan re
bibe şahdeyî, ji bo paqij bûna xwe,
tiştên ku Mûsa emir kiriye[2], bide!
45 Lê belê ew derket û dest bi bang
kirina gellek tiştan û belavkirina vê
gotinê kir, ûsa ku, êdî Îsa nikarîbû
bi eşkereyî biketa bajarekî; lê li
derve, li derê tenha dima û ji her
alî ve dihatin cem wî.

*Başkirina yekî kûd*

Met 9,1-8; Lûq 5,17-26

2 Piştî çend rojên din, dema
ku ew dîsa vegeriya Kefer-
nahûmê, hat bihîstin ku ew li
mal e. 2 Û pirr mirov civiyabûn;
wusa ku, êdî li cem derî jî cîhê
sekinê nema bû û Îsa gotin[3] ji
wan re digot. 3 Û hinek mirov
hatin cem wî û kûdek ku ji ali-
yê çar kesan ve hatibû hilgirtin,
anîn. 4 Ji ber ku, ji ber ajaweyê
nikarîbûn nêzîkî wî bibin; paşî
wan banê xaniyê mala ku ew lê
ye vekirin û rakirin, livînê ku yê
kûd tê de veketiye daxistin jêr.
5 Lê belê dema ku Îsa baweriya
wan dît, ji yê kûd re got: Lawo,
gunehên te efû bûn! 6 Lê belê
hinek ji alimên zagonê li wir
rûniştibûn û di dilên xwe de difi-
kirîn: 7 Ev mirov çima ûsa diaxi-
fe? Kufrê dike! Ma ji Xwedê pê
ve kî dikare gunehan bibexşîne?
8 Îsa jî hema di ruhê xwe de
bi van ramanên wan hesiya û
ji wan re got: Çima hûn van
tiştan di dilê xwe de difikirin?
9 Ma kîjan hîn hêsan e? Ji yê
kûd re gotina: Gunehên te ha-
tin bexşandin, an gotina: Rabe,
livînê xwe rake û bimeşe?
10 Lê belê bona hûn bizanibin ku
rayedariya Lawê Mirov li rûyê
erdê heye ku gunehan bibexşîne;
ji yê kûd re got: 11 Ez ji te re
dibêjim, rabe, livînê xwe rake û
here mala xwe! 12 Û ew jî rabû,
hema livînê xwe rakir û li pêş
çavên her kesî derket çû; wusa
ku, hemû şaş û metal mabûn û ji
Xwedê re şikir kirin û gotin: Me
tu carî tiştekî ûsa nedîtiye!

*Îsa bangî Lêwî dike*

Met 9,9-13; Lûq 5,27-32

13 Û ew dîsa çû qeraxa golê û
hemû gel dihatin cem wî, wî jî
hînî wan dikir. 14 Dema ku ew
derbas dibû, di cîhê bacgirtinê de
rûniştî Lêwiyê lawê Alfay dît û ji
wî re got: Li pey min were! Ew jî
rabû û li pey wî çû.
15 Û wusa bû ku, dema ew di mala
wî de li ser sifrê rûniştibû, gellek
karmendên bacê[4] bi Îsa û şagirtên
wî re li ser sifrê rûniştîbûn; ji ber
ku hejmara yên ku li pey wî diçûn

[1] Karmendên perestgehê, yên peristinê û ayînê.
[2] (3.Mûsa 13:49; 14:2)
[3] Yanê gotina Xwedê.
[4] Cihûyên ku bona serwerên biyan, yê Romiyan bacê (bêşê) didan hev.

gellekî bûn. 16 Û gava alimên
zagonê û Fêrisiyan[1], dîtin ku ew
bi gunehkar û bacgirtan re xwa-
rinê dixwe, ji şagirtên wî re gotin:
Çima ew bi bacgirt û gunehkaran
re dixwe û vedixwe? 17 Dema Îsa
vêya bihîst, ji wan re got: Ne yên
saxlem, lê yên nexweş hewceyî
bijîşk[2] in. Ez ne ji bo banga kesên
salih, lê ji bo banga gunehkaran
hatim.

*Pirsek di derheqê rojiyê de*

Met 9,14-17; Lûq 5,33-39

18 Şagirtên Yehya û Fêrisiyan ro-
jiyê digirtin û ew hatin cem wî û
pirsîn: Şagirtên Yehya û yên Fêri-
siyan rojiyê digirin, gelo çima
şagirtên te rojiyê nagirin? 19 Îsa jî
ji wan re got: Heta ku zava bi wan
re be, ma kesên dawetê dikarin ku
rojiyê bigirin? Heta ku zava bi wan
re be, ew nikarin rojiyê bigirin.
20 Lê belê rojên ku zava ji wan bê
stendin dê bên, wê demê, dê ew
ê di wan rojan de rojiyê bigirin.
21 Tu kes kincekî kevin, bi perçê
cawê nû pîne nake; ya na dê pîna
nû ji cawê kevin biqete û cîhê çi-
riyayî hîn jî xerabtir dibe. 22 Û tu
kes xemra nû naxe meşkên kevin;
ya na dê xemra nû meşkan biteqî-
ne, xemr jî ziyan dibe, meşk jî; lê
xemra nû tenê dikin meşkên nû.

*Pirsa roja Sebtê*

Met 12,1-8; Lûq 6,1-5

23 Û wusa bû ku, roja Sebtê Îsa di
nava zeviya dexlê re derbas dibû. Û
dema dimeşiyan, şagirtên wî dest
pê kirin, similên genim qetandin.
24 Fêrisiyan ji wî re gotin: Bi-
nihêre, çima ew roja Sebtê tiştên
ku ne caiz e, dikin? 25 Û Îsa ji
wan re got: Ma qey we qet ne-
xwend, dema Dawid û yên pê re
birçî û motaj man çi kirin? 26 Di
dema Serokkahîn Abiyatar de ew
ket mala Xwedê nanên xweşiyê,
yên ku xeynî kahînan ji kesên din
re ne caiz e, xwar û da kesên bi
xwe re jî[3]. 27 Û ji wan re got: Mi-
rov ne ji bo roja Sebtê, roja Sebtê
ji bo mirovan hatiye afirandin!
28 Bi vî awayî Lawê Mirov, Xu-
danê roja Sebtê ye jî.

*Yekî dest seqet tê başkirin*

Met 12,9-14; Lûq 6,6-11

3 Û ew dîsa ket kenîştê. Û li wir
zilamekî destê wî hişk bûyî,
hebû. 2 Ew jî bona ku Îsa sûcdar
bikin, bi gotina, hela dê ew ê roja
Sebtê wî baş bike, çavnêrîtiyê lê
dikirin. 3 Û Îsa ji mirovê dest hişk
re got: Rabe ser pêlan û derkeve
navendê! 4 Û wî ji wan re got: Ma
roja Sebtê qencî kirin, an xerabî
kirin caiz e? Can rizgar kirin, an

1 Di Cihûdan de firqekî olê.
2 Doktor, hekîm.
3 (1.Samûyêl 21:6)

kuştin? Lê belê ew bêdeng man.
5 Û Îsa bi hêrs li dora xwe nihêrt,
ji ber dilhişkbûna wan kesirî û ji
zilam re got: Destê xwe dirêj bike!
Wî jî dirêj kir û destê wî dîsa bû
wekî halê xweyî berê. 6 Fêrisî
derketin derve, hema bi Hêrodesi-
yan[1] re bona ku dê ew ê çawa Îsa
bikujin dest bi şêwrê kirin.
7 Îsa tevî şagirtên xwe vekişiya
qeraxa golê û ajaweyeke mezin,
ji Celîlê li pey wî hat. 8 Û yên ku
kirinên wî bihîstibûn, ajaweyeke
mezin ji Cihûstanê û ji Orşelîmê
û ji Îdomeyê û ji aliyê Urdunê û
ji herêma Sûr û Saydayê hatin
cem wî. 9 Îsa bona ku di nava
ajaweyê de, di tengasiyê de nemî-
ne, ji şagirtên xwe re got ku,
bila lotkekê biçûk amade bikin.
10 Ji ber ku wî gellekan qenc
dikir, wusa ku, hemûyên xwedî
dert bûn, bona ku destê xwe di wî
de bidin, bi ser wî ve dihêwirîn.
11 Dema ruhên xerab wî didîtin,
xwe li ber wî diavêtin erdê, diqêri-
yan û digotin: Tu Lawê Xwedê yî!
12 Û wî ji wan re emir dikir ku,
bila kîbûna wî eşkere nekin.

*Hilbijartina donzdeh Şagirtan*

Met 10,1-4; Lûq 6,12-16

13 Îsa derket serê çiyê û yên ku
wî dixwestin, bangî cem xwe kir;
ew jî hatin cem wî. 14 Û wî donz-
deh kes bona ku bi wî re bimînin
û wan ji bo wazdayînê bişîne
15 û bona qewirandina cinan ra-
yedar bike hilbijart: 16 Şîmûnê ku
navê Pêtrûs dayê 17 û Boanerces,
yanê, yên ku navê: Lawên Xurmî-
na ezmîn daye wan, lawên Zebe-
dî Aqûp û birayê wî Yûhena 18 û
Andrêyas, Fîlîpûs, Bartolomeyo,
Meta, Tûmas, Aqûpê lawê Al-
fay, Tadeyos, Şîmûnê Welatparêz
19 û Cihûdayê Îsxeryotî, yê ku
Îsa da dest.

*Bi Ruhê Pîroz qewirandina cinan*

Met 12,22-32; Lûq 11,14-23

20 Û ew çûn malekê û dîsa ajawe
civiya, ewqas ku, ew nikarîbûn
xwarinê jî bixwin. 21 Dema miro-
vên wî vêya bihîstin, derketin ku
wî bigirin; ji ber ku wan digot: Wî
aqilê xwe winda kiriye! 22 Alimên
zagonê yên ji Orşelîmê hatibûn,
digotin: Di wî de Beelzebûl[2] heye
û ew cina bi hêza serokê cinan di-
qewirîne! 23 Îsa jî wan bangî cem
xwe kir û bi wekokan ji wan re
got: Ma Îblîs çawa dikare Îblîs bi-
qewirîne? 24 Ger welatek di nava
xwe de du parî bûbe, ew welat ni-
kare li ser pêlan bimîne. 25 Û ger
malek di nava xwe de du parî bûbe,
ew mal nikare li ser pêlan bimîne.
26 Ger Îblîs li dijî xwe rabûbe û
bûbe du parî, êdî nikare li ser pêlan

[1] Alîkarên qiral Hêrodês.

[2] Serokê cinan.

bisekine, dibe ku dawiya wî hati-
be. 27 Lê belê tu kes nikare têkeve
mala yê xurt û mala wî tazî bike;
lê belê pêşiyê destên wî girê bide,
wê demê dikare mala wî tazî bike.
28 Bi rastî ez ji we re dibêjim:
Hemû gunehan û hemû kufrên
mirovan dê bêne bexşandin, 29 lê
belê her kî ku kufrê li Ruhê Pîroz
bike, tu carî nayê bexşandin, lê
ew bi gunehê bêdawî ve sûcdar e.
30 Ji ber ku wan digot: Ruhê xerab
di wî de heye.

*Dê û birayên Îsa*

Met 12,46-50; Lûq 8,19-21

31 Dayik û birayên Îsa hatin li
derve sekinîn, xeber şandin û
bangî wî kirin. 32 Ajawe li dora
wî rûdinişt û ji wî re gotin: A vay,
dayik û birayên te li derva ne, li
te digerin! 33 Îsa bersiv da wan
û got: Ma dayika min û birayên
min kî ne? 34 Û li dora xwe, li
kesên dora xwe rûniştiye nihêrt û
got: A vay, dayika min û birayên
min! 35 Ji ber her kî ku xwesti-
na Xwedê bîne cîh, birayê min û
xwuşka min û dayika min ew e.

*Razên Serweriya Xwedê*

4 Û wî li qeraxa golê, dîsa dest
bi hînkirinê kir. Û li dora wî
ajaweyek ewqas mezin civiya ku,
ew li lotkeya di golê de yî siwar
bû û rûnişt û hemû ajaweyî li
qeraxa golê, li reşayiyê bûn.
2 Û wî gellek tişt bi wekokan hînî
wan dikir û di hînkirina xwe de ji
wan re got:

*Wekoka tovê*

Met 13,1-9; Lûq 8,4-8

3 Guhdarî bikin! A vay, cotkar
derket ku tovê biçîne. 4 Û wusa
bû ku, gava wî tov direşand, hinek
ketin qeraxa rêgehê û civîkan hatin
û ew xwarin. 5 Û hinek ketin nava
baxiran, cîhê ku axa wê kêm bû û
ji ber ku axa wan ne kûr bû, hema
şiv dan. 6 Lê belê dema roj hilat,
qemirî û bona ku reha wê tunebû,
hişk bû. 7 Û hinek ketin nav histi-
riyan; histirî mezin bûn û wê xeni-
qandin û wê berê neda. 8 Û hinek
ketin axa qenc, mezin û zêde bûn û
ber dan û hinekan sîh, hinekan şêst
û hinekan jî sed qat ber dan. 9 Û
wî ji wan re got: Yên ku guhê wanî
bibihîze hene, bila bibihîze!

*Armanca wekokan*

Met 13,10-17; Lûq 8,9-10

10 Dema ew bi tenê ma, tevî
Donzdehan yên ku li hawirdora wî
bûn, ji bo wekokan jê pirsîn. 11 Wî
jî ji wan re got: Razên Serweriya
Xwedê ji we re hatine dayîn, lê
belê ji kesên li derve ne re, her tişt
bi wekokan tê gotin; 12 da ku: Yên
dinêrin bila binihêrin û nebînin û
yên dibihîzin bila bibihîzin û fêhm
nekin, nebe ku vegerin û ji wan re
bête bexşandin.

*Wateya tovê tê eşkerekirin*

Met 13,18-23; Lûq 8,9-10

13 Û wî ji wan re got: Ma hûn
van wekokan fêhm nakin? Wê
çaxê hûn ê hemû wekokan çawa
fêhm bikin? 14 Cotkar gotinê
diçîne. 15 Li cîhê gotin tête çan-
din, yên ku li qeraxa rê ew in;
dema ku dibihîzin, Îblîs tê û go-
tina di dilê wan de hatiye çandin
radihêje, dibe. 16 Û bi vî awayî
yên ku li ser baxiran hatine çan-
din ew in; gava gotinê dibihîzin
hema bi dilşayî wê qebûl dikin,
17 lê belê ji ber ku rehê wan tune,
tenê demekê kurt dimînin. Yên
ûsa dema ku ji bo gotinê tengasî
û zilmê bibînin, hema diçerixin û
dikevin. 18 Û yên ku di nav sti-
riyan de hatine çandin ew in ku;
gotinê dibihîzin, 19 lê belê xema
vê dinyayê û xapînokiya dewle-
mendiyê û hewesên wekî din di-
kevin navê û gotinê dixeniqînin û
ew bê ber dimîne. 20 Û yên ku li
axa qenc ve hatine çandin ew in
ku; gotinê dibihîzin, qebûl dikin
û hinek sîh, hinek şêst û hinek jî
sed qatî ber didin.

*Qendîlê datînin ser şimadankê*

Met 5,15-16; Lûq 8,16-18; 11,33-36

21 Û wî ji wan re got: Ma qendîlê
bona xistina bin olçeka zadê, an jî
bin livînan tînin? Ma ne ji bo danî-
na ser şimadankê[1] ye? 22 Ji ber ku
ger ne bona kişfbûnê be, tu tiştê
veşartî nîne û ger ne bona derkeve
ronahiyê be, tiştekî veşartî nîne.
23 Yê ku guhên wî ji bo bihîstinê
hene, bila bibihîze! 24 Û wî ji wan
re got: Bala xwe bidin tiştên ku
hûn dibihîzin. Hûn bi kîjan olçekê
bipîvin, bi wê olçekê dê ji we re
bê pîvandin û ji we re dê bi ser
de bê zêdekirin. 25 Lewma yê kî
hebe; dê ji wî re bête dayîn; lê belê
yê kî tune be; yê ku pê re ye jî, dê
jê bête stendin.

*Wekoka tova şivê dide*

26 Û wî got: Serweriya Xwedê,
mîna zilamê ku tovê direşîne axê
ye. 27 Dibe şev, radize; dibe roj
radibe. Bi xwe ew nizane, lê belê
tov şivê dide û pêş ve diçe. 28 Ax
bi xwe zad dide; pêşiyê şivê, da-
wiyê simil, dawiya dawîn jî hebên
ku simil tijî dikin dide. 29 Dema
zad digihêjin, zilam hema oraxê
lê dixe. Ji ber ku dema çinandina
zad hatiye.

*Wekoka heba xerdelê*

Met 13,31-32; Lûq 13,18-19

30 Û wî got: Em Serweriya Xwe-
dê mîna çi bişibînin, an jî em bi
wekokek çawa li ber we daynin?
31 Mîna hebek xerdelê ye ku,
dema tête çandin, her çiqas li rûyê
erdê, di nava hemû tovan de ya
herî biçûk be jî, 32 paşî çandinê

[1] Mûmdank, şamdank..

digihêje û hemû nebatan hîn jî
mezintir dibe; guliyê mezin ber-
dide; ûsa ku, civîkên li ezmîn di-
karin di bin siya wê de bi cîh bin.
33 Û wî gotinê bi gellek wekokên
mîna vêya bi axaftinekî gel jê
fêhm bike, dianî ziman. 34 Û
bêyî wekokan ji wan re nedigot;
lê belê dema ku bi şagirtên xwe
re tenê dima, her tiştî ji wan re
eşkere dikir.

*Îsa bahozê aş dike*

Met 8,23-27; Lûq 8,22-25; Zeb 107,23-31

35 Wê rojê, dema bû êvar, wî ji
wan re got: Em derbasî aliyê din
bibin! 36 Wan jî ajawe berdan û
wî bi lotka ku ew tê de ye birin;
bi wî re lotkên din jî hebûn. 37 Û
bahozeke mezin teqiya û şepêl ûsa
êrîşî lotkê dikirin ku, êdî lotke tijî
dibû. 38 Ew jî, li aliyê paşê lotkê
bû û li ser balîfekê radiket. Wan,
wî hişyar kirin û jê re gotin: Ma-
moste, ma xema te bi helaqbûna
me nîne? 39 Ew jî rabû, bi baho-
zê ve xeyidî, ji golê re got: Hiş
be, bisekine! Ba daket û bendera-
yeke mezin çêbû. 40 Û wî ji wan
re got: Ma çima hûn ûsa tirsonek
in? Ma hîn baweriya we nîne?
41 Ew jî bi tirsekî mezin tirsiyan
û ji hev û din re gotin: Ma ev kî
ye ku, him bahoz û him jî gol jê
re îtaet dikin?

*Başkirina zilamekî cinoyî*

Met 8,28-34; Lûq 8,26-39

5 Û ew hatin aliyê dinî golê,
welatê Girasîniyan. 2 Gava ku
Îsa ji lotkê derket, zilamekî ruhê
wî yê mindar heye, hema ji goran
derket û çû pêrgîniya wî. 3 Cîhê
ku ew lê rûdinişt di nav goran
de bû û tu kesî nikarîbû ku wî bi
zincîran jî girê bide; 4 ji ber ku
pirr caran ew bi qeyd û zincîran ve
hatibû girêdan, lê belê wî zincîran
şikestandibû û qeydan perçe
kiribû û tu kesî nikarîbû ku wî zeft
bikira. 5 Û ew her tim şev û roj li
serê çiyan û di nava goristanê de
diqêriya û xwe bi keviran birîndar
dikir. 6 Dema ku wî ji dûr ve Îsa
dît, baz da û ji wî re secde kir 7 û
bi dengekî bilind qêriya û got: Ya
Îsa, Lawê Xwedayê Bilind, ma
te çi ji min e? Ez bi heqê Xwedê
sondê didim te; ezabê li min meke!
8 Ji ber ku wî jê re gotibû: Ya ruhê
xerab; ji vî zilamî derkeve! 9 Û jê
pirsî: Navê te çî ye? Û wî bersiv
da û got: Navê min Lejyon e[1], ji
ber ku em gellek in! 10 Û bona
ku ew wan ji wê herêmê dernexe,
ew pirr li ber wî geriya. 11 Li wir,
li qeraxa çiya, keriyek beraza ya
mezin diçêriya. 12 Û hemû cin li
ber wî geriyan û gotin: Me bişîne
van berazan, em têkevin wan!
13 Îsa jî destûr da wan. Ruhên
xerab jî derketin û ketin berazan
û ew keriyê ku qasî du hezarî bû,

---

1 Liqek leşkerî ya Romiyan, nêzîkî 6000 leşker e.

ji kendala kûr, ber bi golê ve hate
avêtin û di golê de fetisîn. 14 Û
şivanê berazan reviyan û li bajar
û gundan, nûçeyê belav kirin. Û
ew jî ji bo dîtina tiştên ku bûye
hatin. 15 Û ew hatin cem Îsa,
dînê ku berê lejyonek cinan tê
de bû, hiş li serî, kinc lêkirî û ew
rûniştî dîtin û tirsiyan. 16 Û yên
ku bûyerê dîtibûn, têgihandina
tiştên ku hatiye serê zilamê bi cin
û di derheqê berazan de, ji gel re
kirin. 17 Û bona ku ew ji herêma
wan here, dest pê kirin û li ber
wî geriyan. 18 Û dema ku ew ket
lotkê, zilamê ku berê bindestiyê
cinan bû, li ber wî geriya ku bi wî
re bimîne. 19 Lê belê Îsa nehişt û
ji wî re got: Vegere mala xwe, cem
yên xwe û hemû tiştên ku Xudan
bo te kir û çawa merhametê li te
kir, ji wan re bibêje! 20 Ew jî çû,
li herêma Dêkapolîsê[1], dest pê kir
û Îsa bona wî her çi kiribû, belav
kir û her kes ecêb dima.

*Keçika Yaîros û pîreka ku donzdeh sal e xwîn jê diçe*

Met 9,18-26; Lûq 8,40-56

21 Dema ku Îsa bi lotkê dîsa der-
basî aliyê din bû, ajaweyek mezin
li dora wî civiya û ew jî li qeraxa
golê bû. 22 Û a vay, yekî ji se-
rokên keniştê ku navê wî Yaîros
bû hat, dema wî ew dît, xwe avêt
lingên wî 23 û ew pirr li ber wî
geriya û got: Keçika min ya biçûk
li ber mirinê ye; were û destê xwe
deyne ser, da ku, ew baş bibe û
bijî! 24 Û ew jî bi wî re çû û aja-
weyeke mezin li pey wî diçû û
hawirdor lê teng dikirin.
25 Û li wir, pîrekek donzdeh sal e
ku xwîn jê diçe hebû 26 û ji destê
gellek hekîman zehf kişandibû,
hemû hebûna xwe xerc kiribû û
baş nebûbû; lê belê hîn jî xerab-
tir bûbû. 27 Gava wê tiştên ku di
derheqê Îsa de hatine gotin bihîst,
di nava ajawê de ji paş ve hat û
dest da kincên wî. 28 Ji ber ku
wê digot: Ger ez tenê destê xwe li
kincên wî xim, ez ê xelas bibim!
29 Û hema çavkaniya xwîna wê
ziwa bû û pîrekê jî di kûrbûna be-
dena xwe de hês kir ku, ji wê keserê
xelas bû. 30 Îsa hema fêhm kir ku
hêzek ji wî çû û di nava ajawê de
vegeriya û got: Ma kî destê xwe li
kincên min xist? 31 Şagirtên wî jî,
jê re gotin: Tu dibînî ku ajawe dor
li te teng kiriye, dîsa jî tu dibêjî: Kî
destê xwe li kincên min xist? 32 Û
ew bona ku kesê vêya kiriye bibî-
ne, li dora xwe nihêrt. 33 Pîrekê
jî wergera di xwe de dizanîbû; bi
tirs lerizî û hat, xwe avêt lingên wî
û hemû rastiyê ji wî re got. 34 Lê
belê wî ji wê re got: Keça min, ba-
weriya te, te xelas kir, bi xweşiyê
here û ji êşa xwe qenc bibe!

[1] Tête mana deh bajaran; navê wilayetek li rojhilata çemê Urdunê ye.

35 Hîn Îsa diaxifî, zilaman ji mala
serokê kenîştê ve hatin û gotin:
Keça te mir, êdî tu çima Mamoste
bêaram dikî? 36 Lê belê gava
Îsa, gotina ku hate gotin bihîst,
ji serokê kenîştê re got: Metirse,
tenê bawer bike! 37 Û wî nehişt
ku xeynî Pêtrûs û Aqûp û birayê
Aqûp Yûhena kes li pey wî herin.
38 Û gava ku ew hate mala serokê
kenîştê, yên ku bi gale gal digirîn
û diqêrin dîtin. 39 Gava ew ket
hundir, ji wan re got: Çima hûn
dikin qêrîn û digirîn? Zarok
nemiriye, lê radikeve! 40 Lê ew
jî, gellekî bi wî dikeniyan. Lê
belê paşî ku wî bi xwe hemûyan
derxistin derve, dayik û bavê
zarokê û kesên bi wî re ne girt û
çû ket cîhê ku zarok lê ye. 41 Bi
destê zarokê girt û jê re got: Talîta
kûmî! ku wergera wê: Keçikê,
ez ji te re dibêjim: Rabe! ye.
42 Keçik jî hema rabû û geriya; ji
ber ku ew donzdeh salî bû. Û ew
gellek şaş û metal man. 43 Û wî ji
wan re, bila vêya kes nizanibe û
baş li wan emir kir û got ku, bila
tiştekî xwarinê bidin keçikê.

*Bêbaweriya gelê Nisretê*

Met 13,53-58; Lûq 4,16-30

6 Û ew ji wir derket û hat welatê
xwe û şagirtên wî jî li pey wî
çûn. 2 Dema bû roja Sebtê, li
kenîştê dest bi hînkirinê kir; gel-
lekan wî bihîstin, şaş man û gotin:
Ev tiştan ji vî zilamî re ji ku derê
ne? Zaniyariya ku ji wî re hatiye
dayîn, gelo çî ye? Ma ev karên
bi qudret yên ku bi destên wî ve
çêdibin, çine? 3 Ma ev ne xeratê
lawê Meryem û birayê Aqûp û
Yose û Cihûda û Şîmûn e? Ma
xwuşkên wî ne li vir, li cem me
ne? Û di wî de tilpekî bûn.
4 Îsa jî ji wan re got: Peyxam-
berekî, xeynî welatê xwe, li nav
mirovê xwe û ji mala xwe pê ve,
li cîhekî din ne bêrûmet e! 5 Û
li wê derê hêz neanî ku karê bi
qudret bike, sirf destên xwe danî
ser çend nexweşan û wan qenc ki-
rin. 6 Bi bêbaweriya wan ve şaş
ma. Û ew li gundên dorê digeriya
û hîn dikir.

*Şandina donzdeh Şagirtan*

Met 10,5-15; Lûq 9,1-6

7 Û wî bangî Donzdehan kir û dest
pê kir, wan dudo bi dudo şand û
rayedariya qewirandina ruhên xe-
rab da wan. 8 Û wî emir da wan
ku, bona rêwîtiyê xeynî çoyekê
tiştekî bi xwe re nebin; divê ne
nan, ne kîs, ne jî di nava şûtikê
xwe de pere bi xwe re bibin;
9 lê belê ji wan re got ku bila ça-
rixan bikin lingê xwe û du kirasan
li xwe mekin. 10 Û wî ji wan re
got: Her li ku derê ku hûn bikevin
malekê, heta ku hûn ji wir derke-
vin, li wê derê bimînin. 11 Her ku
der we qebûl neke û we guhdarî

nekin, dema hûn ji wir derkevin,
toza bin lingên xwe, bona ku ji
wan re bibe şahdeyî, dawişînin!
Bi rastî ez ji we re dibêjim: Di
roja daraziyê de dê rewşa welatê
Sodom û Gomorayê ji ya wî ba-
jarî çêtir bibe!
12 Ew jî derketin û bona ku mirov
tobe bikin, waz dan. 13 Û wan
gellek cin diqewirandin û gellek
nexweşan, rûn li wan didan û baş
dikirin.

*Kuştina Yehyayê vaftîzkar*

Met 14,1-12; Lûq 9,7-9

14 Qiral Hêrodês jî bihîst; ji ber ku
namdariya wî belavî her derê bûbû
û hinekan digotin: Ev Yehyayê
vaftîzkar e ku ji nav miriyan
rabûye; ji ber vê yekê di wî de
keramet tên kirin! 15 Lê hinekên
din digotin: Ew Êlyas e û hinekên
din jî digotin: Mîna peyxamberên
din peyxamberek e. 16 Lê belê
dema Hêrodês vêya bihîst, got:
Yehyayê ku serê wî jêkirime, ji
nav miriyan vejiyaye! 17 Ji ber ku
Hêrodês bi xwe, bona Hêrodiya
jina Fîlîpoyê birayê xwe zilam
şandibû û Yehya girtibû, girêdabû
û avêtibû zindanê; ji ber ku ew bi
wê pirekê re zewicîbû. 18 Ji ber
ku Yehya ji Hêrodês re gotibû:
Zewaca te û jinbira te ne caiz e!
19 Hêrodiya jî bo vê yekê gir bi wî
ve girêdabû; dixwest wî bikuje, lê
belê wê nikarîbû bikira. 20 Ji ber
ku Hêrodês zanîbû Yehya mirovek
rast û pîroz e; ji wî ditirsiya û ew
diparêst. Dema ku wî guhdarî
dikir, pirr şaş dima û bi dilşahî wî
guhdarî dikir.
21 Di roja bûyîna Hêrodês de,
dema roja munasib ya ku ji zi-
lamên xwe yî mezin re, serpêlan
re û ji kesên pêşhatiyên Celîlê re
ziyafetê dide hat, 22 dema keça
Hêrodiyayê ket hundir û reqisî,
ew rewş li xweşiya Hêrodês û yên
ku pê re li ser sifrê rûniştine re çû
û qiral ji keçikê re got: Bixwaze ji
min, tu çi bixwaze ez ê bidim te!
23 Û wî ji wê re sond xwar: Tu
ji min her çi bixwazî, heta nêvi-
yê qiraletiya xwe, ez ê bidim te!
24 Ew jî derket û çû ji diya xwe
re got: Ez çi bixwazim? Diya wê
got: Serê Yehyayê vaftîzkar bi-
xwaze! 25 Û ew hema bi lez çû
cem qiral û daxwaza xwe ji wî re
got: Ez dixwazim ku tu niha serê
Yehyayê vaftîzkar li ser sêniyekê
bidî min! 26 Qiral zehf xemgîn
bû; lê belê ji ber sondê û yên ku
bi wî re li sifrê rûniştîbûn, ne-
xwest keçikê red bike. 27 Û qiral
hema ji leşkeran yekî şand û emir
da ku serê wî bîne. 28 Ew jî çû di
zîndanê de serê wî jê kir û serê wî
li ser sêniyekê anî û ew da keçi-
kê û keçikê jî ew da diya xwe.
29 Û dema ku şagirtên Yehya
vêya bihîstin, hatin û meytê wî
girtin û kirin gorekê.

*Îsa pênc hezar kesî têr dike*

Met 14,13-21; Lûq 9,10-17; Yû 6,1-14

30 Û şagirt li cem Îsa civiyan
û hemû tiştên ku kiribûn û hîn
kiribûn ji wî re gotin. 31 Wî jî
ji wan re got: Hûn bi tena serê
xwe werin cîhekî tenha û hinekî
rawestin! Ji ber yên ku dihatin û
diçûn pirr bûn, ûsa ku, wan wext
nedidît xwarinê bixwin. 32 Û ew
bi lotkê, bi tena serê xwe çûn
cîhekî tenha. 33 Gellek kesên
ku çûna wan dît, wan nas kirin
û ji hemû bajaran, bi peyatî ketin
rê û berî wan gîhîştin wî cîhî.
34 Û dema Îsa peya bû, ajaweyeke
mezin dît û gunehê wî bi wan hat,
ji ber ku ew mîna mihên bê şivan
bûn û ji wan re dest bi hînkirina
gellek tiştan kir. 35 Û ji ber ku
wext pirr dereng bû, şagirtên wî
hatin cem wî û jê re gotin: Ev der
cîhekî tenha ye û wext jî dereng
e; 36 wan berde ku, bila herin
çewlîg û gundên der û dorê, ji
xwe re xwarinê bistînin. 37 Lê
belê wî bersiv da û ji wan re got:
Hûn xwarinê bidin wan! Û wan
ji wî re gotin: Ma em herin bi du
sed dînarî[1] nan bistînin û bi wan
bidin xwarin? 38 Wî jî ji wan re
got: Çend nanê we hene? Herin
û lê binihêrin! Û gava ku wan
fêhm kirin, gotin: Pênc nan û du
masiyê me hene.
39 Û wî emir da wan ku, hemû
kom bi kom li ser giyayê hêşîn
rûnin. 40 Û ew jî bi sedan û bi
pênciyan, kom bi kom rûniştin.
41 Û wî pênc nan û du masî rahişt
li ezmanan nihêrt, dua şikiryê kir
û nan parî kir û ji bo di nava gel
de par bikin, da şagirtên xwe; her-
du masiyan jî di nava hemûyan de
par kir. 42 Û hemûyan xwarin û
têr bûn. 43 Ji perçeyan û ji ma-
siyan donzdeh zembîl tijî hildan.
44 Û hejmara yên ku ji wan nanan
xwarin, pênc hezar mêr bûn.

*Îsa li ser avê dimeşe*

Met 14,22-36; Yû 6,16-21

45 Heta ku ew gel berde, bona
hema li lotkê siwar bibin û berî
wî derbasî aliyê din, Beytsay-
dayê bibin, zorê da şagirtên xwe.
46 Û piştî ku wî xatir ji wan
xwest, bona dua kirinê çû çiyê.
47 Û dema bû êvar, lotke di nava
golê de bû û ew jî tena serê xwe li
reşayiyê bû. 48 Û wî dît ku, ew di
bêrkişandinê de di tengasiyê de
ne; ji ber ku ba li dijî wan bû. Û
ber bi sibê ew li ser golê meşiya
û nêzîkî wan hat û wî xwest ku
ji wan derbas bibe. 49 Lê belê
wan dema ku dîtin ew li ser golê
dimeşe, gotin qey ew xeyaletek e
û qêriyan. 50 Ji ber ku hemûyan
wî dîtin û ketin şaşwaziyê. Lê
belê wî hema bangî wan kir û got:
Cesûr bin; ez im, metirsin! 51 Û

1 Li rasteka menan binêrin.

ew li cem wan, li lotkê siwar bû
û ba sekinî. Û ew di nav xwe de
gellek şaş bûn. 52 Lewma wan bi
karê nanan fêhm nekiribûn; ji ber
ku dilê wan hişk bûbû.
53 Dema ku ew derbasî aliyê din
bûn, li Cenasêrtê derketin reşayiyê
û lotke girê dan. 54 Dema ku ew ji
lotkê derketin, gel hema wî nas kir
55 û hemû hawirdorê herêmê bi
bazdan geriyan; cîhê ku Îsa lêbû
bihîstin; dest pê kirin û nexweşan
li ser livînan birin wê derê. 56 Û li
gund, li bajaran, an jî li çewlîgan,
biketa her ku derê, nexweşan di-
xistin qadan û bona ku tenê destê
xwe bi dawa kincên wî bixin, li
ber wî digeriyan. Û hemûyên ku
destê xwe lê dixistin, baş dibûn.

*Fêrisî û kevneşopa kalikan*
Met 15,1-9

7 Fêrisî û hinek alimên zagonê,
yên ku ji Orşelîmê hatibûn, li
dora wî civiyan 2 û dîtin ku hin-
ek şagirtên wî bi destên gemarî,
yanê, neşuştî nan dixwin. 3 Ji
ber ku Fêrisî û hemû Cihûd li gor
kevneşopiya bav û kalên xwe,
heta ku destên xwe baş neşon,
xwarinê naxwin. 4 Û dema ji sûkê
jî bên bêşuştin xwarinê naxwin. Û
wekî din, di derheqê şuştina kase
û şerbik û firaxên sifir de gellek
kevneşopên din jî hene ku, bi cîh
anînê wan qebûl kirine. 5 Fêrisi-
yan û alimên zagonê ji wî pirsîn:
Çima şagirtên te li gor kevneşopa
kalan nameşin û bi destê gemarî
nan dixwin?
6 Lê belê wî bersiv da û ji wan re
got: Îşaya li ser we durûyan qenc
peyxamberîtî kiriye! Mîna ku ha-
tiye nivîsîn: Ev gel bi lêvên xwe
min dihesibîne, lê belê dilên wan
ji min dûr e. 7 Û wekî talîmatê
emirên mirovan didin hînkirinê û
bi berhewayî bi min re diperistin[1].
8 Ji ber ku hûn dev ji emrê Xwe-
dê berdidin û bi kevneşopa miro-
van digirin. 9 Û wî ji wan re got:
Hûn çi xweş dikarin bona ajotina
kevneşopa xwe, emrê Xwedê red
bikin! 10 Ji ber ku Mûsa gotiye:
Ji bavê xwe û dayika xwe re hur-
metê bike! Û: Yê ku kufrê li dayik
û bavê xwe bike, bila muheqeq bê
kuştin[2]! 11 Lê belê hûn dibêjin:
Ger zilamek ji dayika xwe re an jî
ji bavê xwe re bibêje: Tiştê ku ji
aliyê min ji te re bibe fêde qurban
e, yanê, hatiye nezirkirin[3], 12 êdî
hûn nahêlin ku ji bo dayika xwe
an jî bavê xwe tu tiştî bike. 13 Bi
vî awayî hûn vê kevneşopa xwe
ji nifşan digihînin nifşan û gotina
Xwedê radikin[4]. Û hûn pirr tiştên
mîna vêya çêdikin.

---

[1] Îşaya 29:13
[2] (2.Mûsa 20:12; 5.Mûsa 5:16 û 2.Mûsa 21:17)
[3] Yanê ji Xwedê re hatiye dayîn.
[4] Xera dikin.

*Tiştên ku mirov gemarî dikin*

Met 15,10-20; Gal 5,19-21

14 Û wî dîsa gel bangî cem xwe
kir û ji wan re got: Hûn hemû min
guhdarî bikin û fêhm bikin! 15 Tu
tiştek nîne ku ji derve bikeve hun-
dirê mirov û wî gemarî bike; lê
belê tiştên ku mirov gemarî dikin,
yên ji hundirê mirov ve derdike-
vin in. 16 Ger guhên kesekî ji bo
bihîstinê hebin, bila bibihîze!
17 Û dema ew ji ajaweyê[1] veqetiya
û vegeriya malê, şagirtên wî mana
wekokê ji wî pirsîn. 18 Wî jî ji wan
re got: Ma hûn jî wusa fêhmkor in?
Ma qey hûn fêhm nakin, her çi tiştê
ku ji derve bikeve mirov, nikare wî
gemarî bike? 19 Ji ber ku ew naçe
dilê wî, lê belê diçe mahdê wî û
ji wir diçe derve. Wî bi vê gotina,
hemû xwarinan paqij kir. 20 Û wî
got: Yên ku mirov gemarî dike,
tiştên ku ji hundirê mirov ve derdi-
kevin in. 21 Ji ber ku, ji hundir, ji dilê
mirovan ve, fikrên xerab, bê exlaqî,
dizî, kuştin, zîna, 22 timayî, xerabî,
hîle, sefahet, çavnebarî, çêr, quretî û
bêaqilî, derdikeve. 23 Hemûyên van
tiştên xerab ji hundir ve derdikevin
û mirov gemarî dikin.

*Baweriya Pîreka Fênîkî*

Met 15,21-28

24 Ew ji wir rabû û çû herêma Sûr
û Saydayê; ket malekê û nexwest
ku tu kes bi vêya bizanibe û hêz
neanî ku xwe veşêre. 25 Lê belê
pîrekek ku di keçika wê de ruhê
xerab heye, di derheqê Îsa de aga-
hiyê stend û hema hat û xwe avêt
lingên wî. 26 Ev pîrek Grekî bû
û ji nîjada Fênîkiya Sûriyê bû.
Bona cin ji qîza wê biqewirîne, li
ber wî geriya.
27 Îsa ji wê re got: Berde, bila
pêşiyê zarok têr bibin! Ji ber ne
rast e ku mirov nanê zarokan bigi-
re û bavêje ber kûçikan! 28 Pîrekê
jî bersiv da û ji wî re got: Belê,
ya Xudan, lê kûçik jî li binya sifrê
kurtêlê ber zarokan dixwin! 29 Û
wî ji wê re got: Ji ber vê gotinê
here, cin ji keçika te derketiye!
30 Û pîrek çû mala xwe dît ku cin
jê derketiye û keçik di nava livîn-
an de raketiye.

*Zilamekî kerr tê başkirin*

Îşa 35,5-6

31 Dîsa ji herêma Sûrê derket, di
nav Saydayê û di nava herêma
Dêkapolîsê de derbas bû û hat
gola Celîlê. 32 Yekî kerr û lal anîn
cem wî û bona destê xwe deyne
ser, li ber wî geriyan. 33 Wî jî
ew girt cîhekî ji ajawê cihêtir e û
tiliyên xwe xist guhê zilam û tû
kir û destê xwe li zimanê wî xist.
34 Dawiyê li ezman nihêrt û axîn
kişand û jê re: Effata! Yanê: Vebe!
got. 35 Û hema guhên wî vebûn
û zimanê wî vebû û bi avahiyek

1 Gel, ajaweya gel.

xweş dest bi axaftinê kir. 36 Wî bona ku ji kesekî re nebêjin, emir li wan kir; lê belê her çiqas wî bi zêdeyî emir li wan dikir, wan ewqas zêde bang dikirin. 37 Û ew gellek ecêb diman û digotin: Wî her tiştî baş kir; him guhên kerran vedike, him jî lalan diaxifîne!

*Îsa çar hezar kesî têr dike*

Mat 15,32-39

8 Di wan rojan de dîsa gava ajaweyek mezin çêbû û ji ber ku tiştekî wanî xwarinê nemabû, Îsa bangî şagirtên xwe kir û ji wan re got: 2 Ez li ber gel dikevim, ji ber niha ev sê roj e ku bi min re ne û tu tiştekî wanî xwarinê nîne. 3 Ger ez wan bi birçîtî bişînim malên wan, ew ê di rê de bikevin; ji ber ku hin kes ji wan ji rêya dûr hatine. 4 Û şagirtên wî bersiv dan wî: Li vir, li cîhê tenha, dê mirov vana bi nan ji ku derê ve bikaribe têr bike? 5 Û wî ji wan pirsî: Çend nanê we hene? Û wan gotin: Heft. 6 Wî emir da gel ku li erdê rûnin û pişt re heft nanî rahişt, şikir kir û ew parî kir, bona belav kirinê da şagirtên xwe û wan jî danîn ber gel. 7 Çend masiyê wanî biçûk jî hebûn û piştî wî dua şikiryê kir, got ku bila ew vana jî deynin ber wan. 8 Wan xwarin û têrbûn; heft zembîl tijî ji kurtêlên bermayî hildan. 9 Hejmara yên ku xwarin, qasî çar hezar kesî bû û wî ew berdan. 10 Û hema bi şagirtên xwe re li lotkê siwar bû û derbasî aliyê Dalmanûtayê bû.

*Havêna Fêrisiyan û Hêrodês*

Met 16,1-12

11 Fêrisî hatin û bi Îsa re dest bi guftegoyê kirin; bona ku wî biceribînin, ji wî xwestin ku elametek ji ezman rê wan bide. 12 Wî jî ji dil ve axînek kişand û got: Ma ev nifşe çima elametekê digere? Bi rastî ez ji we re dibêjim: Dê tu elametî ji vê nifşêya re neyê dayîn! 13 Û wî wan berda û dîsa li lotkê siwar bû û derbasî aliyê dinî golê bû.

14 Û wan ji bîr kiribûn ku bi xwe re nan bistînin û di lotkê de, li cem wan tenê nanek hebû. 15 Îsa jî emir li wan kir û got: Xwe biparêzin, ji havêna Fêrisiyan û havêna Hêrodês ve birevin! 16 Û ew di nav xwe de axifîn û gotin: Ji ber ku nanê me tune! 17 Îsa bi vê dizanîbû û ji wan re got: Çima hûn dibêjin nanê me tune û diaxifin? Ma hûn hîn aqil nagehînin û fêhm nakin? Ma dilê we hişk bûye? 18 Çavên we hene, ma hûn nabînin? Guhên we hene, ma hûn nabihîzin? Ma nayê bîra we, 19 dema min pênc nanî di nava pênc hezar kesî de par kir, we çend zembîl kurtêl berhev kirin? Wan jî ji wî re gotin: Donzdeh! 20 Dema min heft nanî di nava

çar hezar kesî de par kir, we çend
zembîl tijî kurtêl berhev kirin?
Wan jî gotin: Heft! 21 Û wî ji wan
re got: Ma hûn hîn fêhm nakin?

*Li Beytsaydayê zilamekî kor tê başkirin*

Îşa 42,7

22 Û ew hatin Beytsaydayê û zi-
lamekî kor anîn cem wî û ji bo bi
destê xwe lêxe li ber wî geriyan.
23 Û wî bi destê yê kor ve girt û wî
derxist derveyî gund û gava tû ça-
vên wî kir, destê xwe da ser û jê re
pirsî: Ma tu tiştekî dibînî? 24 Wî li
jor nihêrt û got: Mirovan dibînim, ji
ber ku tiştên mîna daran dimeşin, di-
bijêrim! 25 Paşê dîsa destê xwe danî
ser çavên wî; wî çavên xwe vekir, bi
baldarî nihêrt; baş bû û hemû tiştan
zelal dît. 26 Îsa jî ew şand mala wî û
ji wî re got: Mekeve gund jî!

*Şahdeyiya ku Pêtrûs di derheqê Îsa de kir*

Met 16,13-20; Lûq 9,18-21

27 Û Îsa bi şagirtên xwe re çû
gundên Qeyseriya Fîlîposê û di
rê de ji şagirtên xwe re pirsî û ji
wan re got: Li gor gotina gel ez
kî me? 28 Wan jî bersiv dan û go-
tin: Dibêjin Yehyayê vaftîzkar e,
hinek dibêjin Êlyas, hinekên din
jî dibêjin, ji peyxamberan yek e.
29 Wî jî ji wan re got: Lê hûn, hûn
dibêjin ez kî me? Pêtrûs bersiva
wî da û jê re got: Tu Mesîh î! 30 Û
wî emir da wan ku di derheqê wî
de tiştekî ji kesî re nebêjin.

*Îsa cara yekemîn ji bo mirin û vejîna xwe dibêje*

Met 16,21-28; Lûq 9,18-21

31 Û wî destpêkir û hînkirina,
hewcedariya, divê Lawê Mirov
gellekî êş bikişîne, ji aliyê ka-
lepîran, serokkahînan û alimên
zagonê ve bête red kirin, bête
kuştin û piştî sê rojî biveje, ji wan
re kir. 32 Û wî ev gotin bi eşkeretî
digot. Li ser vêya Pêtrûs wî kişand
aliyekî, dest pê kir û wî azirand.
33 Lê belê ew vegeriya û li
şagirtên xwe nihêrt, Pêtrûs azi-
rand û got: Ji ber min vekişe Îblîs!
Ji ber ku tu ne tiştên Xwedê, lê
tiştên mirovan difikirî!
34 Îsa gel bi şagirtên xwe re bangî
cem xwe kir û ji wan re got: Yê ku
dixwaze li pey min bê, bila xwe în-
kar bike û bila xaça xwe hilgire û li
pey min bê! 35 Ji ber, yê ku bixwa-
ze canê xwe xelas bike, dê ew ê wê
winda bike; lê belê yê ku canê xwe
di oxra min û Mizgîniyê de winda
bike, dê ew ê wê xelas bike. 36 Ji
ber ku ger mirovek hemûya dinê
qezenc bike û canê xwe winda bike,
dê çi feyda wê ji wî re bibe? 37 Ji
ber ku ma mirov, dikare çi ji bo
canê xwe bide? 38 Ji ber ku di nava
vê nifşeya zînekar û gunehkar de,
kî ji min û ji gotinên min şerm bike,
Lawê Mirov jî, dema di mezinahiya

Bavê xwe de, bi milyaketên pîroz
ve bê, dê ji wî kesî şerm bike[1].

9 Û wî ji wan re got: Bi rastî
ez ji we re dibêjim: Di nava
kesên li vir disekinin de, hin kes
hene, berî ku bi qudret hatina Ser-
weriya Xwedê nebînin, dê mirinê
qet tam nekin!

*Xuyabûna Îsa tê guhertin*

Met 17,1-3; Lûq 9,28-36; 1.Pêt 1,16-18

2 Paşî şeş rojan Îsa, Pêtrûs û Aqûp
û Yûhena girt cem xwe û ji yên
din cihê derxist çiyayekî bilind. Û
li ber wan xuyabûniya wî hat gu-
hertin. 3 Kincên wî rewnaq û pirr
spî bûn; li rûyê erdê tu kesên kincan
dişon nikarîbû ew wusa spî bikira.
4 Û di wê demê de Êlyas û Mûsa
ji wan re xuya bûn û ew bi Îsa re
diaxifîn. 5 Û Pêtrûs bersiv da Îsa û
jê re got: Rebbî[2], hebûna me ya vir çi
qenc bû! Em sê çardaxan ava bikin;
yek ji te re û yek ji Mûsa re û yek jî ji
Êlyas re! 6 Ji ber ku wî nizanîbû dê
çi bibêje; ji ber ku zehf tirsiyabûn.
7 Di vê demê de ewrek hat û wan
xist bin siya xwe û dengek ji ewr
hat: Lawê minî xoşewîst ev e; wî
guhdarî bikin! got. 8 Ji nişka ve li
dora xwe nihêrtin, lê xeynî Îsa êdî
tu kesekî li cem xwe nedîtin.
9 Dema ku ji çiya dadiketin, wî
emir li wan kir ku tiştên dîtine,
heta ku Lawê Mirov ji nav miri-
yan ranebe, ji kesekî re nebêjin.
10 Wan jî vê gotinê di nav hev
de veşartin û gelo ji nav miriyan
vejîn çî ye, ji hev û din dipirsi-
yan. 11 Û wan ji wî pirsîn û gotin:
Çima alimên zagonê dibêjin, dê
pêşiyê Êlyas bê? 12 Wî jî ji wan re
got: Ma bi gotina; bi rastî pêşiyê
Êlyas tê û her tiştî datîne cîhê wê
û dê gellek tiştan bikişîne û biçûk
bête dîtin, çawa di derheqê Lawê
Mirov de hatiye nivîsandin?
13 Lê belê ez ji we re dibêjim:
Him Êlyas hat û him jî mîna tiştên
ku di derheqê wî de hatiye nivîsîn,
çi ku wan xwest bi wî kirin.

*Başkirina zarokekî bindestê cinan*

Met 17,14-23; Lûq 9,37-45

14 Dema ew hatin cem şagirtan,
dîtin ku ajaweyek mezin li dora
wan civiyaye û hinek alimên za-
gonê bi wan re ketine guftegoyê.
15 Û dema ku hemûya ajaweyê
wî dîtin, gellek ecêb man û bi lez
çûn cem û silavê dan wî. 16 Û wî
ji alimên zagonê pirsî: Ma hûn bi
wan re ketine guftegoya çi?
17 Û yekî ji gel bersiva wî da û
got: Mamoste, min lawê xwe ji te
re anî, yê ku ruhekî wî yê bêziman
heye; 18 ruh wî li her ku derê
bigire, wî li erdê dixe, ew ji devê
xwe kefê davêje û diranê xwe

[1] An jî: Fedî bike.

[2] An jî: Mamoste.

diqîrçîne û hişk dibe. Ji şagirtên
te re gotim, ruh derxinin; lê belê
wan nikaribûn! 19 Wî jî bersiv da
wan û got: Ya nifşeya bê bawerî!
Ez ê heta kengê bi we re bimînim?
Heta kengê ez ê li we sebir bikim?
Wî bînin cem min! 20 Û ew ji wî
re anîn û gava ku ruh wî dît, hema
lawik bi quwet lerizand û ew ket
erdê, ji devê xwe kefan weşand û
hol bû. 21 Îsa ji bavê wî re pirsî:
Ji kengê ve ev hal hatiye serê wî?
Wî jî got: Ji zaroktiyê ve. 22 Û ji
bona ku wî bikuje, pirr caran ew
him avêt nava agir û him jî nava
avê; lê belê ger tiştekî ji destê te
bê, dilovanî û alîkariyê ji me re
bike! 23 Îsa ji wî re got: Ger ji
destê min bê? Ji bo yê bawer bike
her tişt dibe! 24 Bavê lawik hema
qêriya û bi hêstirên çavan got: Ez
bawer dikim, ya Xudan, alîkariyê
ji bêbaweriya min re bike!
25 Îsa jî gava ku dît gel bi lezîn tê,
ruhê xerab azirand û jê re got: Ez
emir didim te, ruhê lal û kerr, ji
wî derkeve û êdî carek din nekeve
wî! 26 Ruh jî qêriya, wî bi hêz
lerizand û derket; lawik bû mîna
miriyan; ûsa ku, gellekan digotin:
Ew mir! 27 Lê belê Îsa bi destê wî
girt, rakir û lawik rabû.
28 Piştî ku Îsa ket malê, şagirtên
wî bi xisûsiyetê jê pirsîn: Çima
me nikarîbû ku wî[1] derxînin? 29 Ji
wan re got: Yên bi vî cûreyî ji dua
û rojiyê pê ve bi tiştekî din nayên
qewirandin.

*Îsa cara duwemîn ji bo mirin û vejîna xwe dibêje*

Met 17,22-23; Lûq 9,43-45

30 Ew ji wir çûn û ji nav Celîlê re
derbas bûn û Îsa nedixwest ku kes
bi vêya bizane. 31 Ji ber ku wî ders
dida şagirtên xwe û ji wan re digot:
Dê Lawê Mirov bidin destê miro-
van û dê wî bikujin û sê rojî li pey
kuştina xwe, ew dê biveje. 32 Lê
belê wan vê gotinê fêhm nekirin û
ditirsiyan ku ji wî bipirsin.

*Yê herî mezin kî ye?*

Met 18,1-5; Lûq 9,46-50

33 Û ew hat Kefernahûmê û gava
ku li malê bû, ji wan re pirsî:
Guftegoya di rê de di nava we
de bû, çi bû? 34 Lê ew bêdeng
man; ji ber ku di rê de, di nava
xwe de guftegoya, kî herî mezin
e, kiribûn. 35 Piştî ku ew rûnişt,
bangî Donzdehan kir û ji wan re
got: Ger kesek bixwaze bibe yê
yekemîn, dê ew ê bibe yê dawîn
û xizmetkarê her kesî. 36 Û wî
zarokek girt û di nav wan de da
sekinandin; dawiyê wî himbêz
kir û ji wan re got: 37 Her kesê
ku zaroyekê wiha bi navê min qe-
bûl bike, ew min qebûl dike û her
kesê ku min qebûl dike, ne min,
lê yê ku ez şandime qebûl dike.

---

1 Cin.

*Kesê ku ne li dijî me be, ji aliyê me ye*
Lûq 9,49-50

38 Yûhena ji wî re got: Mamoste,
me yekî bi navê te cinan
diqewirand dîtin û em ji wî re
bûn asteng, ji ber ku ew li pey me
nedihat. 39 Lê belê Îsa got: Ji wî
re nebin asteng; ji ber kesek tune
ye ku bi navê min kerametekê
bike û hema ji bo min xerabî
bibêje. 40 Ji ber yê ku ne li dijî
me be, ji aliyê me ye. 41 Ji ber ku
bi rastî ez ji we re dibêjim: Bona
ku hûn yên Mesîh in, her kesê ku
qedehek av bi we de, ew ê xelata
xwe qet winda nake.

*Ceza gunehkirinê*
Met 18,6-9; Lûq 17,1-2

42 Lê belê her kî ku yekî ji van
biçûkên baweriyê bi min tînin,
tilpekî bike, ji wî re çêtir e ku ke-
virekî mezin yê aşê bi histuyê wî
ve daliqînin û wî bavêjin behrê.
43 Ger destê te, te têxe gunehê,
wî jêke, ji bo te bêdest gihaştina
jiyanê, bi hebûna du destî çûna
dojehê û agirê ku qet venamire
qenctir e. 44 Li wê derê kurmê wê
namire û agir jî venamire. 45 Ger
lingê te, te têxe gunehê, wî jêke!
Ji bo te bi lingekî ketina jiyanê, bi
du lingî avêtina dojehê qenctir e.
46 Li wê derê kurmê wê namire û
agir jî venamire. 47 Ger çavê te,
te têxe gunehê, wî derxîne! Ji bo
te bi çavekî çûna te yî Serweriya
Xwedê, bi du çavî ve avêtina te yî
dojehê çêtir e. 48 Li wê derê kur-
mê wê namire û agir jî venamire.
49 Ji ber ku, mîna her qurban bi
xwê ve tête xwê kirin, dê her kes
bi agir ve bête xwê kirin[1]. 50 Xwê
qenc e; lê belê ger xwê xwêybûna
xwe winda bike, hûn ê bi çi tamê
bidin wê? Bila di we de xwê hebe
û pev re li ser xweşiyê bin!

*Pirsek li ser jin berdanê*
Met 19,1-19; Lûq 16-18;
1.Kor 7,10-16.39; Rom 7,2-3

10 Û ew ji wir rabû û hat
sînorên Cihûstanê û aliyê
dinî çemê Urdunê. Dîsa ajawe li
dora wî civiyabûn û wî li ser adeta
xwe dîsa hînî wan dikir.
2 Û Fêrisiyan hatin cem wî û bona
wî biceribînin, jê pirsîn: Ma jin
berdana zilamekî caiz e? 3 Wî jî
bersiv da û ji wan re got: Mûsa çi
emir da we[2]? 4 Wan jî gotin: Mûsa
bona nivîsandina kaxeza berdanê û
berdana pîrekê destûrê daye. 5 Lê
belê Îsa bersiv da û ji wan re got:
Wî ji ber dilhişkiya we vî emrî ji
we re nivîsand. 6 Lê belê Xwedê
di destpêka afirandinê de ew nêr û
mê afirandin. 7 Ji ber vê yekê dê

[1] Û dê her qurban bi xwê ve bête xwêy kirin. Binihêre (3.Mûsa 2:13)
[2] (5.Mûsa 24:1, 3)

zilam dayik û bavê xwe berde û bi
pîreka xwe ve bê girêdan 8 û her-
du jî bibin bedenek; ûsa ku, êdî ew
ne dudu ne, lê bedenek in. 9 Niha,
yên ku Xwedê gihandiye hev, bila
mirov veneqetîne! 10 Şagirtan li
malê, di derheqê vê babetê de dîsa
ji wî pirsîn. 11 Û wî ji wan re got:
Kî ku pîreka xwe berde û bi yeka
din re bizewice, li dijî wê zînayê
dike. 12 Û ger pîrekek mêrê xwe
berde û bi yekî din re bizevice, zî-
nayê dike.

*Îsa zarokên biçûk pîroz dike*

Met 19,13-15; Lûq 18,15-17

13 Û wan zarok dianîn cem wî
ku ew destên xwe li wan bixe,
lê şagirtan yên ku wan dianîn
azirandin. 14 Dema Îsa vêya dît;
hêrs bû û ji wan re got: Berdin,
bila zarok werin cem min; ji wan
re nebin asteng! Ji ber ku Serwe-
riya Xwedê ji yên mîna vana re
ye! 15 Bi rastî ez ji we re dibêjim:
Yê ku Serweriya Xwedê mîna za-
rokekî qebûl meke, tu carî nikare
bikeve wê! 16 Û wî zarok himbêz
kir, destê xwe danî ser wan û wan
pîroz kir.

*Dewlemendî û jiyana bêdawî*

Met 19,16-30; Lûq 18,18-30

17 Dema derket rê, yekî bi bazdan
hate cem wî û li ber wî çok da û
jê pirsî: Mamosteyê qenc, bona ez
jiyana bêdawî bi mêrasî bistînim,
gelo ez çi bikim? 18 Îsa jî ji wî re
got: Ma çima tu ji min re dibêjî
qenc? Xeynî yekî tu kes ne qenc e,
ew jî Xwedê ye! 19 Tu bi emiran
dizanî: Mekuje! Zinê meke! Di-
ziyê meke! Bi derewî şahdeyiyê
meke! Heqê kesekî nexwe! Hur-
metê ji dayik û bavê xwe re bike[1]!
20 Lê wî got: Mamoste, min vana
hemû ji ciwantiya xwe ve, heta
niha anîne cîh. 21 Îsa li wî nihêrt
û jê hez kir û jê re got: Tiştekî te
kêm e! Here, çiyî te heye bifiroşe,
bide xizanan û bi vî awayî dê li
ezmanan xezîneya te bibe û were,
xaçê hilgire û li pey min bimeşe!
22 Lê belê li ser vê gotinê wecê
zilam daliqî û bi keser çû; ji ber
ku gellek malê wî hebû.
23 Îsa li dora xwe nihêrt û ji
şagirtên xwe re got: Çiqas zeh-
met e ku yên dewlemend bikevin
Serweriya Xwedê! 24 Şagirtan
bi gotinên wî şaş man. Lê belê
Îsa dîsa ji wan re got: Zarokno,
çiqas bi zehmet e yên ku hêviya
xwe bi dewlemendiyê ve girêda-
ne, bikevin Serweriya Xwedê!
25 Derbasbûna devê ji qula der-
ziyê, ji ketina kesên dewlemend
a Serweriya Xwedê hêsantir e.
26 Ew zehf ecêb man û ji hev û
din re gotin: Wê çaxê dê kî xelas
bibe? 27 Îsa li wan nihêrt û got:
Li ba mirovan ev nabe, lê belê ne

1 (2.Mûsa 20:12-16; 5.Mûsa 5:16-20)

li ba Xwedê! Ji ber ku li ba Xwe-
dê her tişt dibe[1].
28 Pêtrûs dest pê kir û ji wî re got:
A vay; me her tiştî berda û li pey
te hatin! 29 Îsa bersiv da û got: Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Tu kes nîne
ku, bona min û Mizgîniyê mal, an
bira, an xwuşk, an dayik, an bav,
an zarok, an jî erdên xwe berde,
30 niha, di vê demê de, tevî zilma
ku bikişîne sed qatî zêdetir mal
û bira û xwuşk û dayik û zarok
û erd û di dema bê de jiyana bê-
dawî nestîne. 31 Lê belê pirr kesên
yekemîn dê bibin dawîn û pirr
kesên dawîn jî dê bibin yekemîn.

### *Îsa cara sêwemîn ji bo mirin û vejîna xwe dibêje*

Met 20,17-19; Lûq 18,31-34

32 Ew di rê de diçûn Orşelîmê; Îsa
ji pêşiya wan ve diçû û şagirtên wî
ecêb diman; yên ku li pey wî diçûn
jî ditirsiyan. Wî dîsa Donzdehan
girt cem xwe û dest bi gotina
tiştên ku dê bêne serê xwe kir:
33 A vay, em diçin Orşelîmê; Lawê
Mirov dê bidin destê serokên
kahînan û alimên zagonê; ew jî,
dê ceza mirinê bidin wî û wî bidin
destê neteweyan; 34 ew ê henekê
xwe pê bikin û tifî[2] ser wî bikin û
wî qamçî bikin û bikujin û ew ê
piştî sê rojî dê dîsa biveje.

### *Xwestina Aqûp û Yûhena*

Met 20,20-28

35 Lawên Zebedî Aqûp û Yûhena
nêzîkî wî bûn û gotin: Mamoste,
xwestinek me heye, em dixwazin
ku tu vêya ji bo me bikî! 36 Wî ji
wan re got: Hûn çi dixwazin ku
ez bona we bikim? 37 Wan jî jê
re gotin: Ji me re bibexşîne, di bi-
lindiya te de, yek ji me li rastê te
û yek ji me li çepê te bila rûnên!
38 Îsa jî ji wan re got: Hûn niza-
nin ku hûn çi dixwazin. Ma hûn
dikarin kaseya[3] ku ez jê vedix-
wim, vexwin? Û hûn dikarin bi
vaftîzbûna ku ez ê pê bêm vaftîz-
kirin, vaftîz bibin? 39 Wan jê re
gotin: Em dikarin! Îsa ji wan re
got: Kaseya ku ez jê vexwim, hûn
ê vexwin û bi vaftîzbûna ku ez
pê bêm vaftîzkirin, hûn ê vaftîz
bibin; 40 lê belê hiştina rûniştina
we yî li çep û rastê min, ne di des-
tê min de ye; lê ev ji bo kî hatibe
amadekirin; ji bo wan e.
41 Û dema deh şagirt vêya
bihîstin, dest pê kirin bi Aqûp û
Yûhena re xeyidîn. 42 Îsa wan
bangî cem xwe kir û ji wan re got:
Hûn dizanin ku, di nav netewan
de yên serok tên dîtin, serweriyê
li wan dikin[4] û kesên pêş ve tên
jî li ser wan hukumdariyê dajon.
43 Lê belê dê di nava we de ûsa

---

[1] An jî: Ji bo Xwedê her tişt biîmkan e.
[2] Tûyî.
[3] Tas, kasik.
[4] Rêvebiriyê li wan dikin.

nebe; kesê ku di nava we de
dixwaze bibe mezin, bila bibe
xizmetkarê we 44 û kesê ku di
nava we de dixwaze bibe yekemîn,
bila bibe xulamê hemûyan. 45 Ji
ber ku Lawê Mirov jî ne bona ku
jê re xizmet bête kirin, lê bona
xizmetê bike û canê xwe di oxra
gellekan de bi berdêl bide, hat.

*Çavên Bar-Tîmeyoyê kor vedibe*

Met 20,29-34; Lûq 18,35-43

46 Û ew hatin Êrîhayê. Û dema
Îsa û şagirtên xwe, bi ajaweyeke
mezin ji Êrîhayê ve derket, par-
sekek kor, bi navê lawê Tîmay,
Bar-Tîmeyo[1] li qeraxa rêgehê
rûniştî bû. 47 Û dema ku wî bihîst
Îsayê Nisretî derbas dibe, dest pê
kir qêriya û got: Ya Lawê Dawid
Îsa, li min were rehmê! 48 Gellek
kesan bona ku hiş bibe, wî aziran-
din; lê belê ew hîn zêde qêriya û
bang kir: Ya Lawê Dawid, li min
were rehmê! 49 Îsa jî sekinî û got:
Bangî wî bikin! Û wan bangî zi-
lamê kor kirin û jê re gotin: Xwe-
zî ji te re, bangî te dike! 50 Wî jî
eba xwe avêt, hol bû û hate cem
Îsa. 51 Îsa destpêkir û ji wî pirsî:
Ma tu çi dixwazî ku, ez ji bo te
bikim? Yê kor jî jê re got: Rab-
bûnî[2], bila çavên min bibînin! 52
Îsa jî ji wî re got: Here, baweriya
te, tu xelas kirî! Û hema çavên wî
dîtin û di rê de, li pey Îsa çû.

*Îsa diçe Orşelîmê*

Met 21,1-11; Lûq 19,28-40;Yû 12,12-19

11 Û dema ew nêzîkî Orşelîmê
bûn û hatin herêma li qeraxa
Çiyayê Zeytûnê Bêytfacê û Bey-
tanyayê, wî du şagirtên xwe şand
û ji wan re got: 2 Herin gundê
hemberî xwe. Dema ku hûn bike-
vinê, hûn ê dehşikekî hîn kesek
lê siwar nebûye, girêdayî bibînin;
wê vekin û ji min re bînin! 3 Ger
yek ji we re: Hûn çima vêya di-
kin? bibêje. Hûn jî bibêjin: Hew-
ceyiya Xudan ji vêya re heye û
dê wê hema şunda bişîne vira!
4 Ew çûn û li ser rê, dehşika li ber
deriyê xaniyekî girêdayî dîtin û ew
vekirin. 5 Hin kesên li wir gotin:
Hûn çi dikin, ma hûn çima dehşikê
vedikin? 6 Şagirtan jî mîna ku Îsa
gotibû, ji wan re gotin û wan ke-
san dev ji wan berdan. 7 Û wan
dehşikê ji Îsa re anîn û kincên xwe
li ser raxistin û ew li ser siwar bû.
8 Gellekan kincên xwe, hinekan jî
guliyên ji zeviyan jê kiribûn raxis-
tin ser rê. 9 Kesên li pêşiyê diçûn
û yên li paş ve dihatin diqêriyan
û digotin: Hozanna[3]! Yê di navê
Xudan de tê pîroz e! 10 Bila pîroz
be Serweriya bapîrê me Dawid,

1 Bartolomeyo.
2 Mamoste.
3 Di maneya ji me re kerem bike de ye.

ya ku di navê Xudan de tê! Li herî
bilindahiyan Hozanna! 11 Îsa ket
Orşelîmê û çû Perestgehê. Û piştî
ku her alî ji ber çavan ve derbas
kir, ji ber ku wexta êvarê bû, bi
Donzdehan ve çû Beytanyayê.

*Darê hêjîrê tê lanetkirin*

Met 21,18-22; Lûq 19,45-48

12 Û dotira rojê, dema ku ji
Beytanyayê derketin, ew birçî
bû. 13 Û dema ku wî darek hêjîra
peldayî ji dûr ve dît, got dibe ku ez
hêjîran li ser wê bibînim û çû wê
derê. Û dema ku ew hate cem, ji
bilî pelan tiştekî nedît; ji ber ku ne
demsala hêjîran bû. 14 Îsa bersiv
da û ji wê re got: Bila êdî abadîn tu
kes ji te mêwe nexwe! Şagirtên wî
jî vêya bihîstin.
15 Û ew hatin Orşelîmê; Îsa kete
Perestgehê û destpêkir û firoşkar
û girtiyarên ku di Perestgehê de
bûn avête derve û maseyên pere-
hurkêran û kursiyên kevokfiroşan
gêr kirin. 16 Û wî nehişt ku, tu kes
firaqekî di nav Perestgehê de der-
bas bike. 17 Û wî hîn kir û ji wan
re got: Ma ji mala min re; dê mala
duayê ji bo hemû netewan bê go-
tin, nehatiye nivîsîn[1]? Lê belê we
ew kiriye geha rêbiran[2]! 18 Se-
rokên kahînan û alimên zagonê
vêya bihîstin û bona kuştina wî li
rêyekê geriyan; lê ji wî ditirsiyan;
ji ber ku hemûya gel li ser hînki-
rina wî ecêb dima. 19 Û dema ku
bû êvar, ew ji bajêr derketin.
20 Û serê sibê, dema ew ji cem ve
derbas dibûn; dara hêjîrê ji rehê
wê ve hişk bûyî dîtin. 21 Û Pêtrûs
di bîra xwe de anî û ji wî re got:
Rebbî[4] binihêre, dara hêjîrê ku te
lê naletê anî, hişk bûye! 22 Îsa jî
bersiv da û ji wan re got: Bila ba-
weriya we bi Xwedê hebe. 23 Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Kî ji vî
çiyayî re bêje: Rabe û xwe bavêje
behrê û di dilê xwe de bê şuphe
bawer bibe ku dê xwestina wî
bibe, dê jê re bibe. 24 Ji bo vêya
ez ji we re dibêjim: Her tiştên
ku we bi duê ve xwestiye, bawer
bikin ku we wê stendiye û dê ji we
re bibe! 25 Û dema ku hûn radibin
û dua dikin, ger giliyek we li dijî
yekî hebe, wî bibexşînin ku, Bavê
we yî li ezmanan jî bila sûcên we
bibexşîne. 26 Lê belê ger hûn
nebexşînin, Bavê we yî li ezma-
nan jî sûcên we nabexşîne.

*Rayedariya Îsa*

Met 21,23-37; Lûq 20,1-8

27 Dîsa hatin Orşelîmê. Û dema
Îsa di Perestgehê de digeriya se-
rokên kahînan, alimên zagonê û
kalepîran hatin cem wî û jê re go-

[1] Îşaya 56:7
[2] An jî: Qul. Yêremya 7:11
[3] Mamoste.

tin: 28 Tu van tiştan bi kîjan raye-
dariyê dikî? An jî rayedariya kiri-
na vana kî da te? 29 Îsa jî ji wan re
got: Ez ê jî tiştekî ji we bipirsim;
bersivê bidin min, ez ê jî, ka van
tiştan bi çi rayedariyê dikim ji we
re bêjim. 30 Ma vaftîza Yehya ji
ezmanan bû, an ji mirovan bû?
Bersivê bidin min! 31 Ew jî di
nava xwe de fikirîn û gotin: Ger
em bêjin ji ezmanan e, ew ê bêje,
wê çaxê çima hûn bi wî bawer
nebûn? 32 Lê belê ger em bêjin:
Ji mirovan e – ji gel ve ditirsiyan;
ji ber ku hemûyan Yehya, bi rastî
peyxamber dihesiband. 33 Û ber-
siva Îsa dan û jê re gotin: Em ni-
zanin! Îsa jî ji wan re got: Ez jî ji
we re nabêjim ku, ka ez van tiştan
bi kîjan rayedariyê dikim!

*Wekoka kirekirên rez*

Met 21,33-46; Lûq 20,9-19; Îşa 5,1-7

12 Û wî bi wekokan ji wan
re dest bi gotinê kir: Zi-
lamekî rez danî û dora wê çeper
kir û kortikekê kola û qûleyek
çêkir. Û wê bi kirê da rezvanan û
çû welatekî din. 2 Û wexta dem-
sala wê hat, wî kolekî şand bona
tiriyê para xwe ketiye bistîne.
3 Û rezvanan ew girtin, lê dan û
destvala şandin. 4 Û wî dîsa ko-
leyekî din ji wan re şand; lê belê
wan serê wî şikand û heqaret li wî
kirin û şandin. 5 Wî yekî din şand,
ew jî kuştin û wekî din hîn gel-
lekên din şandin; li hinekan xis-
tin, hinek jî kuştin. 6 Lawekî wî
yê xoşewîst jî hebû; dawiyê lawê
xwe ji wan re şand û got: Dê ew
ê ji lawê min re hurmetê bikin!
7 Lê belê rezvanan ji hev û din
re gotin: Mêrasxwer ev e! Werin,
em wî bikujin, dê mêras bibe ya
me! 8 Û wan bi wî girtin, kuştin
û avêtin derveyî rezê. 9 Niha, dê
xwediyê rezê çi bike? Ew ê bê,
rezvanan helaq bike û rez bide
kesên din! 10 Ma we vê Nivîsa
jî qey nexwendine? Kevirê ku
çêkeran nexwest, bû kevirê serê
quncikê. 11 Ev ji aliyê Xudan ve
çêbû û ew di çavên me de karekî
nûwaze[1] ye. 12 Û wan xwestin ku
wî bigirin, lê belê ji gel ve tirsi-
yan; ji ber wan fêhm kirin ku ew
di vê wekoka de qala wan dike. Û
wan wî berdan û çûn.

*Tiştên Qeyser bidin Qeyser û yê Xwedê jî bidin Xwedê*

Met 22,15-22; Lûq 20,20-26

13 Û bona ku wî bi gotinên wî
bixînin dafikê, hin kesên Fêrisî û
alîgirê Hêrodês şandin cem wî.
14 Ew hatin û jê re gotin: Ma-
moste, em dizanin ku, tu miro-
vekî rast î û tu di nava mirovan
de bê bijartin û bê veqetandin,
rêya Xwedê bi duristî hîn dikî,
ji ber ku tu li rûyê mirovan na-

1 Zebûr 118:22-23

nihêrî. Ma caiz e ku em bacê bi-
din Qeyser an na? Ma divê em
bidin, an nedin? 15 Lê belê Îsa
bi durûyitiya wan dizanîbû û ji
wan re got: Ma hûn çima min di-
ceribînin? Ka dînarekî ji min re
bînin ku ez bibînim! 16 Wan jî
anîn. Wî ji wan re got: Ev sûret
û ev nivîs yê kî ye? Wan gotin:
Yê Qeyser in! 17 Îsa ji wan re
got: Tiştên Qeyser bidin Qeyser
û tiştên Xwedê bidin Xwedê! Û
ew li wî ecêb man.

*Pirsek li ser vejînê*

Met 22,23-33; Lûq 20,27-40

18 Sadûqiyên[1] ku digotin vejîn
nîne, hatin cem wî û jê pirsîn û
gotin: 19 Ya Mamoste, Mûsa ji
me re nivîsiye[2] ku: Ger birayê
zilamekî bimire, pîreka xwe bî
bihêle û zarok nehêle, bila birayê
wî pîreka wî bistîne û nifşeya
wî bajo. 20 Heft bira hebûn. Yê
pêşîn pîrekek girt û zarok nehişt
û mir. 21 Yê duduyan wê pîrekê
girt, ew jî nebû xwedî zarok û
mir û yê sisêyan jî wusa bû. 22 Û
her heftan jî wê girtin û bê zarok
mirin. Paşî hemûyan pîrek jî mir.
23 Di vejînê de, ger ew bivejin,
dê pîrek bibe ya kîjanî? Ji ber
ku her heft jî bi wê re zewicîn.
24 Îsa jî ji wan re got: Hûn ne
Kitêban, ne jî Hêza Xwedê diza-
nin, ma sedema şaşbûna we ne ev
e? 25 Ji ber ku dema ew ji mirinê
ve bivejin ne dizevicin, ne jî tên
zewicandin; lê mîna milyaketên
ezman in. 26 Lê belê ger em bên
vejîna miriyan; di Pirtûka Mûsa
de, di birra deviyê de Xwedê
ji wî re: Ez Xwedayê Birahîm
û Xwedayê Îshaq û Xwedayê
Aqûp im[3] gotiye, qey we nex-
wendin? 27 Ew ne yê miriyan, lê
Xwedayê zindiyan e; hûn gellekî
ji rê derketine.

*Emirê yekemîn kîjan e?*

Met 22,34-40; Lûq 10,25-28

28 Gava alimekî zagonê guf-
tegoya wan guhdarî dikir û dît
ku wî bersivek xweş da wan; ber
bi wî hat û jê pirsî: Di nav hemû
emiran de ya yekemîn kîjan e?
29 Îsa bersiv da wî: Ya yekemîn
ev e: Bibihîze, ya Îsraêl! Xudan
Xwedayê me, Xudan yek e. 30 Û
ji Xudan, Xwedayê xwe, bi hemû
dilê xwe, bi hemû canê xwe,
bihemûramanêxweûbihemûhêza
xwe hez bike[4]! 31 Ya duwemîn
jî ev e: Ji cîranê xwe mîna xwe hez
bike[5]! Ji vana mezintir, emirek
din tune. 32 Alimê zagonê ji wî
re got: Te qenc got Mamoste!
Te bi gotina xwe yî: Xwedê yek

1 Di Cihûyan de firqek olê.
2 (5.Mûsa 25:5)
3 (2.Mûsa 3:6)
4 (5.Mûsa 6:4-5)
5 (3.Mûsa 19:18)

e û xeynî wî yekî din nîne, rast
got. 33 Û bi hemû dil û bi hemû
feraset û bi hemû hêzê ji wî hez
kirin û hez kirina cînarê xwe
mîna xwe, ji hemû pêşkêşiyên
şewitandinê û ji hemû qurbanan
zêdetir e! 34 Gava Îsa dît ku wî
bersivek bi baqilî da, jê re got: Tu
ji Serweriya Xwedê ne dûr î! Êdî
kesî newêribû ku ji wî bipirse.

*Mesîh Lawê kî ye?*

Met 22,41-46; 23,1-36; Lûq 20,41-47

35 Dema Îsa di Perestgehê de hîn
dikir, dest pê kir û got: Çawa dibe
ku alimên zagonê dibêjin; Mesîh
Lawê Dawid e? 36 Dawid bi xwe
ji Ruhê Pîroz ve gotiye: Xudan
ji Xudanê min re got: Heta ku
ez neyarên te ji lingên te re pêlik
deynim; li rastê min rûnê[1]! 37 Da-
wid bi xwe ji wî re dibêje: Xudan;
ma ew çawa dibe Lawê Dawid?
Û ajaweya mezin, bi kêfxweşî li
wî guhdarî dikirin.
38 Dema hînkirinê wî got: Xwe ji
alimên zagonê biparêzin, yên ku
hez dikin bi kincên dirêj bigerin,
di qadan de 39 silav li wan bê
kirin û di keniştan de li kursiyên
pêş û di dawetan de li cîhên jorîn
rûnin. 40 Ew malên jinebiyan
dadiqurtînin û bona nîşandanê bi
dûdirêjî dua dikin; hukumê wan
dê hîn jî girantir be.

*Xelata pîreka bî*

Lûq 21,1-4

41 Îsa li hemberî xeznê rûniştibû
û gelên ku pere davêjin qutîkê
temaşe dikir. Gellek kesên dew-
lemend, pirr avêtinê. 42 Pîrekek
bî ya xizan hat, du perê paxirî,
qasî yek manqerî[2] bi qîmet avêtê.
43 Îsa şagirtên xwe bangî cem
xwe kir û ji wan re got: Bi rastî ez
ji we re dibêjim: Vê pîreka bî ya
xizan ji her kesî zêdetir pere avêt
qutîkê. 44 Ji ber ku wan hemû-
yan, zêdeyiya ji ber dewlemendi-
ya wan maye avêtinê; lê belê vê
pîreka ji xizaniya xwe, hebûn û
tunebûna xwe, bona jiyana wê çi
di dest de bû, hemû avêtê.

*Nîşankên dawîhatinê*

Met 24 û 25; Lûq 21,5-37

13 Û dema ew ji Perestgehê
derket, şagirtekî wî jê re
got: Mamoste, binihêre, kevirên
bi çi celebî û xaniyên bi çi şiklî!
2 Îsa jî ji wî re got: Tu van xani-
yên mezin dibînî? Dê li vir, ke-
vir li ser kevir nemîne ku, neyê
helweşandin!
3 Û dema ew li Çiyayê Zeytûnê,
li hemberê Perestgehê rûniştibû,
Pêtrûs û Aqûp û Yûhena û Andrê-
yas, bi taybetî ji wî pirsîn: 4 Ji me
re bibêje, ev tiştana dê kengê bibin?
Û elametê çêbûna hemû van tiştana

1 Zebûr 110:1

2 Li rasteka menan binêrin.

dê çi be? 5 Îsa jî ji wan re dest bi
gotinê kir: Xwe biparêzin ku, bila
tu kes we ji rê dernexe! 6 Gellekan
dê bi navê min bên û bibêjin: Ez
ew im! û gellek kesî ji rê derxinin.
7 Dema hûn galegala şer û nûçeyên
şer bibihîzin, metirsin! Divê vana
bibin, lê belê ev hîn dawî nîne.
8 Ji ber ku dê netew li dijî netewê
û welat li dijî welatê rabin û cîh bi
cîh zelzele bibin û dê xela çêbibe.
Vana destpêka êşan in.
9 Lê belê hûn li xwe miqate bin! Ji
ber ku dê ew we bidin dadgehan, li
keniştan dê li we xin û bona min,
bona ku ji wan re bibe şahdeyî hûn
ê li ber walî û qiralan bêne seki-
nandin. 10 Û divê pêşiyê Mizgînî
ji hemû netewan re bê waz kirin.
11 Dema we bigirin û bidin dadge-
han ji pêşiyê xemê mekin ku hûn
ê çi bibêjin; lê belê di wê demê de
çi ji we re bê dayîn, wê bibêjin!
Ji ber ku yê diaxife ne hûn in, lê
Ruhê Pîroz e. 12 Bira birayê xwe
û bav lawê xwe dê bide mirinê û
dê zarok li dijî dayik û bavên xwe
serî hildin û wan bidin kuştinê.
13 Ji ber navê min dê her kes ji we
bikerihe. Lê belê yê heta dawiyê li
berxwe bide, ew ê xelas bibe.

*Tengasiyên mezin*

Met 24,15-28; Lûq 21,20-24

14 Û dema we dîtin, tiştê mekrûh
yê ku xerab dike li cîhê ku ne li-
yaq e sekiniye, (yê ku dixwîne,
bila fêhm bike) wê çaxê yên ku
li Cihûstanê ne, bila birevin çiya-
yan. 15 Û yê ku li ser xanî ye, bona
tiştekî ji mala xwe bigire, bila da-
nekeve jêr û mekeve hundir. 16 Û
yê ku li zeviyê be, bona eba
xwe bigire, bila şunde venegere.
17 Wey li serê yên ku di wan ro-
jan de bi ducan in û dimêjînin!
18 Dua bikin ku, bila ev di zivis-
tanê de nebe. 19 Ji ber ku dê di
wan rojan de ewqas tengasî bibe
ku; tengasiya mîna wê, ji destpêkê
ve, gava Xwedê dinya afirandiye û
heta niha çênebûye û ne jî dê çêbi-
be. 20 Ger Xudan wan rojan kurt
nekiriba, tu kes dê xelas nebûya;
lê belê ji bo xatirê kesên bijartî yên
ku wî ew bijartine, wî wan rojan
kurt kiriye. 21 Ger wê demê yek
ji we re bibêje: A vay, Mesîh li vir
e! An jî: A vay, li wir e! Pê bawer
nebin. 22 Ji ber ku dê Mesîhên
derewîn û peyxamberên derewîn
derkevin û keramet û mucîzetan
bikin; ger mimkun be, dê yên ha-
tine bijartin jî ji rê derxînin. 23 Lê
belê hûn miqate bin! A vay, min
her tiştî ji pêşiyê ve ji we re got.

*Hatina Lawê Mirov*

Met 24,29-31; Lûq 21,25-28; Dan 7,13-14

24 Lê belê di wan rojan de, li
pey wê tengasiyê: Dê roj tarî
bibe, heyv ronahiya xwe nade,
25 stêrk dê ji ezmên ve bikevin
û qudretên li ezman in dê bihe-

jin. 26 Wê demê dê hatina Lawê
Mirov bi hêz û bilindiyek mezin
di nav ewran de bibînin. 27 Û
wê demê dê ew milyaketên xwe
bişîne û kesên ku wî bijartine, ji
aliyê erdê heta aliyê ezmên, ji çar
bayî bicivîne.
28 Lê belê ji darê hêjîrê ve hînî
methelokê bibin: Dema guliyê wê
binermije û pelên xwe bajo, hûn
fêhm dikin ku, havîn nêz e. 29 Bi
vî awayî, dema ku hûn jî çêbûna
van bûyeran bibînin, bizanibin
ku, ew nêz e, li ber derî ye. 30 Bi
rastî ez ji we re dibêjim: Heta ku
ev tiştana hemû nebin, ev nifşe
derbas nabe[1]. 31 Erd û ezman dê
ji navendê rabin, lê belê gotinên
min ranabin.

*Xeynî Bav tu kes bi wê rojê*
*û saetê nizane*

Met 24,36-51; Lûq 21,34-36;
Rom 13,11-14; 1.Sel 5,4-8

32 Lê belê di derheqê wê rojê an
wê saetê de, ne milyaketên li ez-
man, ne jî Law, xeynî Bav kesek bi
tiştekî nizane. 33 Bala xwe bidinê,
hişyar bin û dua bikin! Ji ber ku
hûn nikarin bizanibin ku ew wext
dê kengê bê. 34 Ev mîna zilamekî
ku çûbe xerîbiyê û dev ji mala xwe
berdabe û rayedariyê dabe xizmet-
karê xwe û kar dabe her yekî ye ku,
ji notirvan re jî hîşyar mayînê emir
kir. 35 Bi vî awayî, hişyar bimînin!
Ji ber ku hûn nizanin ku dê efen-
diyê malê kengê were, êvarê,
nîvê şevê, dema dîk biure[2], an jî
berbi sibehê. 36 Nebe ku ji nişka
ve were û we di xewê de bibîne!
37 Ez çi ji we re bibêjim, ji her
kesî re dibêjim: Hişyar bimînin!

*Serokên kahînan û alimên zagonê ji*
*bo kuştina Îsa dixebitin*

Met 26,1-16; Lûq 22,1-6; Yû 11,45-53

14 Piştî du rojî dê biba Cejna
Fisihê û Nanê Bêhavên.
Serokên kahînan û alimên zagonê
lêkolînê dikirin ku ka dê çawa ew
bi hîle wî bigirin û bikujin. 2 Lê
belê wan digot: Bila di cejnê de
nebe, da ku, bila di nava gel de
tevlihevî dernekeve!
3 Dema Îsa li Beytanyayê, di mala
Şîmûnê bi cizam de li sifrê rûniştî
bû, pîrekek hate û di firaqeke ji
mermerê spî de rûnê nardînê[3] ya
xalis, ya pirr bi qîmet anî; wê fira-
qê şikand û ew li ser serê wî de
rijand. 4 Hinek ji hundirê xwe ve
xeyidîn û gotin: Ma çima ev rûna
hat destbelavî kirin? 5 Ji ber ku ev
rûn ji sê sed dînarî zêdetir karîbû
bihata firotin û dikarîbûn bidana
xizanan. Û li dijî pîrekê gotin.
6 Lê belê Îsa got: Pîrekê rehet

1 Ji navendê ranabe, an jî: Winda nabe.
2 An jî: Bang bike.
3 An jî: Rûnê simbila Hindîstanê.

berdin! Çima hûn wê diêşînin?
Bona min wê tiştekî qenc kir.
7 Ji ber ku xizan her tim li cem we
ne û kengê hûn bixwazin, dikarin
alîkariyê bi wan re bikin; lê belê
ez ê her tim ne li cem we bim.
8 Pîrek tiştên ku ji dest ve hat kir
û wê bedena min bona binerd ki-
rinê ji pêşî ve bi rûn kir. 9 Bi rastî
ez ji we re dibêjim: Ev Mizgînî li
ku derê dinê bê waz kirin, dê ki-
rina vê pîrekê jî bona bîranîna wê
bê gotin.

*Cihûda xayîntiyê dike*

Met 26,14-16; Lûq 22,3-6

10 Û ji Donzdehan Cihûdayê
Îsxeryotî, bona destdana Îsa çû
cem serokên kahînan. 11 Wan jî
dema ku vêya bihîstin, kêfxweş
bûn û wad kirin ku dê pere bidin
wî. Ew jî di gera, dema fersend bê
ka dê çawa Îsa bide dest de bû.

*Xwarina Fisihê*

Met 26,17-30; Lûq 22,7-23; Yû 13,21-30

12 Di roja pêşîn ya Cejna Nanê
Bêhavên de ku qurbana Fisihê
tê serjêkirin, şagirtên wî ji wî re
gotin: Bona ku xwarina Fisihê
bixwî, tu dixwazî em herin li ku
amadekariyê bikin? 13 Îsa du
şagirtên xwe şand û ji wan re
got: Herin bajêr û li wir dê zila-
mek kûzê avê dikişîne derkeve
pêşiya we; li pey wî herin 14 û ji
xwediyê mala ku zilam bikevê re
bibêjin: Mamoste dibêje ku: Ez ê
bi şagirtên xwe re xwarina Fisihê
bixwim, ka oda min ya mêvanan
li ku derê ye? 15 Dê ew ê li qatê
jorîn odeyek mezin raxistî û ama-
de rêyî we bide; li wir, bona me
amadekariyê bikin. 16 Şagirtên
wî jî derketin rê û hatin bajêr û
mîna ku wî ji wan re gotiye dîtin
û wan Fisihê amade kirin.
17 Dema bû êvar, Îsa bi
Donzdehan re hat. 18 Û dema ku
li ser sifrê rûniştibûn û xwarinê
dixwarin wî got: Bi rastî ez ji
we re dibêjim: Yekî ku bi min re
xwarinê dixwe, yekî ji we, dê min
bide dest! 19 Ew jî bi keserî yek
bi yek ji wî re dest bi pirsê kirin:
Ma ez im? gotin. 20 Lê belê wî
bersiv da û ji wan re got: Ji Donz-
dehan yek, yê ku nanê xwe bi
min re di miqilkê de noq dike ye!
21 Bi rastî jî, Lawê Mirov mîna
ku bo wî hatiye nivîsandin diçe,
lê belê wey li serê wî zilamî ku
Lawê Mirov bi navgîniya wî bi
dest ve tête dayîn! Ew zilam qet
nebûya, bona wî dê qenctir biba!

*Sifra ku Îsa ava kir:*
*Nan û xemra wekokî*

Met 26,26-29; Lûq 22,19-20;
1.Kor 11,23-29

22 Û dema ku wan xwarin
dixwar, Îsa nan rahişt, dua şikiryê
kir û ew şikand[1], da wan û got:
Bigirin, bixwin! Ev bedena min e.

23 Û kaseyek rahişt, şikir kir û da
wan û hemûyan jî ji wê vexwarin.
24 Û wî ji wan re got: Ev xwî-
na min e; ya Peymana nû, ya ku
bona gellekan tê rijandinê ye.
25 Bi rastî ez ji we re dibêjim:
Heta roja ku ez di Serweriya
Xwedê de ji ya nû vexwim, êdî ca-
rek din ji dexlê mêwê venaxwim.
26 Û piştî ku wan qesîdeyek xwen-
din, derketin Çiyayê Zeytûnê.

*Îsa înkarkirina Pêtrûs ji berê ve dibêje*

Met 26,31-35; Lûq 22,31-34; Yû 13,36-38

27 Û Îsa ji wan re got: Hûn ê îşev
hemû biçerixin û bikevin, ji ber ku
hatiye nivîsîn: Ez ê li şivan bixim
û dê mîh belav bibin[2]. 28 Lê belê
piştî vejîna min, ez ê berî we biçim
Celîlê. 29 Lê belê Pêtrûs ji wî re
got: Her kes biçerixe û bikeve jî ez
nakevim! 30 Îsa jî ji wî re got: Bi
rastî ez ji te re dibêjim: Îroj, îşev,
berî du carî dîk biure[3] tuyê min sê
carî înkar bikî! 31 Lê belê Pêtrûs
bi tundî got: Ger divê ku ez bi te
re bimirim jî, ez tu car te înkar na-
kim! Hemûyan jî bi vî awayî gotin.

*Gêtşêmanî*

Met 26,36-46; Lûq 22,39-46

32 Û ew hatin cîhekî ku navê wê
Gêtşêmanî ye. Îsa ji şagirtên xwe
re got: Heta ku ez dua bikim,
hûn li vir rûnin! 33 Û wî Pêtrûs,
Aqûp û Yûhena bi xwe re birin û
kete toqînê û gellekî tengezar bû.
34 Ji wan re got: Canê min di dere-
ca mirinê de pirr bi keser e; li vir bi-
sekinin û hişyar bimînin! 35 Hine-
kî pêş ve çû, li ser rû xwe avêt erdê
û bi gotina; ger mimkun be, ev saet
jê derbas bibe, dua kir. 36 Û wî got:
Abba Bavo, bona te her tişt mimkun
e, vê kasê ji min dûr bixe! Lê belê
bila ne xwestina min, bila xwes-
tina te bibe! 37 Û hat û wan di xew
de dît û ji Pêtrûs re got: Şîmûn, ma
tu radikevî? Ma tu hema saetekî jî
nikarîbû hişyar bimaya? 38 Hişyar
bisekinin û dua bikin ku, hûn neyên
ceribandin. Ruh bi daxwaz e, lê belê
beden bêhêz e. 39 Û ew dîsa çû, bi
eynî gotinan dua kir. 40 Û gava ew
cardin vegeriya û dîsa wan di xew
de dît; ji ber ku çavên wan giran
bûn û nizanîbûn ku dê çi bersivê
bidin wî. 41 Û ew cara sisiyan ve-
geriya cem wan û ji wan re got: Êdî
rakevin û rehet bikin. Bes e! Saet
hat. A vay, Lawê Mirov didin destê
gunehkaran. 42 Rabin, em herin! A
vay, yê min daye dest nêzîk bû.

*Îsa tê girtin*

Met 26,47-56; Lûq 22,47-53; Yû 18,3-12

43 Û ew hîn diaxifî, Cihûdayê
ku yekî ji nava Donzdehan bû,

---

1 Parî kir, an jî: Perçe kir.
2 Zekerya 13:7
3 An jî: Bang bike.

hema xuya bû û tevî wî ajawe-
yek ku ji aliyê serokên kahînan,
alimên zagonê û kalepîran ve ha-
tibû şandin bi dar û şûran hatin.
44 Lê belê yê ku ew dabû dest,
nîşanek dabû wan û gotibû: Ez
kî ramûsim, ew e; wî bigirin û
bi ewledariyê wî bibin! 45 Gava
ku ew hat, hema ber bi Îsa çû û
got: Rebbî, Rebbî! û wî ramûsa.
46 Wan dest avêtin ser wî û bi wî
girtin. 47 Lê belê yekî ji kesên
ku li cem wî sekinîbûn, şûrê xwe
kişand û li koleyê Serokkahîn
xist û guhê wî jêkir.
48 Îsa bersiv da û ji wan re got:
Mîna ku li pey rêbirekî bin, ma
hûn bi şûr û daran hatin ku min
bigirin? 49 Ez her roj li Perest-
gehê di nav we de bûm, min hîn
dikir û we ez negirtim. Lê belê
ev, bona ku nivîs bêne cîh çêdibe!
50 Û hemûyan Îsa berdan û revi-
yan. 51 Xortekî ku bi cawê kitanê
bedena xwe ya tazî pêçabû, li pey
wî diçû û zilamên ciwan bi wî
girtin. 52 Lê belê wî, cawê kitanê
hişt û tazî ji ber wan reviya.

*Îsa li ber Civata Netewî*

Met 26,57-68; Lûq 22,54-55;
Yû 18,13-15,19-24

53 Îsa birin cem Serokkahîn û
hemû serokên kahînan û kalepîran
û alimên zagonê li wir civiyan.
54 Pêtrûs, heta nava hewşa Se-
rokkahîn ji dûr ve li pey wî çû û
di hewşê de, bi nobedaran re, li
cem agir rûnişt û dest bi germbûnê
kir. 55 Lê belê hemûya Civata
Netewî û serokên kahînan, bona
ceza mirinê bidin Îsa ji xwe re li
şahdeyan digeriyan û nedidîtin.
56 Ji ber ku gellek kesî li dijî wî
bi derewan şahdeyî kirin, lê belê
şahdeyiya wan hev û din nedigirt.
57 Hinek kes rabûn û bi derewan
li dijî wî şahdeyiyê kirin û gotin:
58 Me gotina wî yî: Vê Perestgeha
ku bi destan ve hatiye avakirin, ez
ê xera bikim û di sê rojî de yekî
din, ya ku bi destan ve çênebûyî
ava bikim bihîst. 59 Lê belê çawa
ku wusa bû jî, şahdeyiya wan hev
û din negirt. 60 Serokkahîn rabû,
derket navendê, ji Îsa pirsî û got:
Ma qey tu qet bersivê nadî? Çî ye
şahdeyiya vana ku li dijî te dikin?
61 Lê belê ew bêdeng ma û qet
bersivê neda. Serokkahîn dîsa pirsî
û ji wî re got: Ma Lawê Yê Pîroz,
Mesîh tu yî? 62 Îsa jî got: Ez im!
Û hûn ê rûniştina Lawê Mirov li
aliyê rastê yê Qudretê û hatina wî
yî bi ewrên ezmên ve bibînin!
63 Serokkahîn kincê xwe çi-
rand û got: Êdî çi motajiya me ji
şahdeyan re heye? 64 We kufrê
bihîstin, hûn çi dibêjin? Bi gotina,
wî ceza mirinê li xwe heq kiri-
ye, hemûyan daraziya xwe dan.
65 Hin kesan dest bi tû kirina ser
wî, bi çavgirêdan û kulmikkirina
wî kirin û jê re digotin: Ka pey-

xambertiyê bike! Nobedaran wî
girtin û sîleyan lê xistin.

*Pêtrûs Îsa înkar dike*

Met 26,69-75; Lûq 22,56-62;
Yû 18,15-18,25-27

66 Dema Pêtrûs li jêr, li hewşê bû,
keçikekî ji xizmetkarên Serokkahîn
hat. 67 Û gava ku wê Pêtrûsê germ
dibe dît, li wî nihêrt û got: Tu jî bi
Îsayê Nisretî re bû! 68 Lê belê wî
vêya înkar kir û got: Tu qala çi dike
ez nizanim û fêhm jî nakim! Û ew
derket ber deriyê ji derve û dîk uri-
ya[1]. 69 Gava keçika xizmetkar wî
dîsa dît, ji yên ku disekinin re dest
bi gotina: Ev ji wan e! kir. 70 Lê
belê wî dîsa înkar kir. Kesên li dorê
sekinîbûn, piştî demekê din dîsa ji
Pêtrûs re gotin: Bi rastî tu ji wan î!
Ji ber ku tu jî ji Celîlê yî. 71 Lê belê
wî dest bi naletê û sond xwarinê kir:
Ez wî zilamê ku hûn dibêjin nas na-
kim! 72 Û hema dîk cara duwemîn
uriya[2]. Gotina ku Îsa jê re gotibû:
Berî ku dîk du caran biure[3], tuyê
min sê carî înkar bikî, Pêtrûs anî
bîra xwe. Û vêya fikirî û giriya.

*Îsa li ber Walî Pîlato*

Met 27,1-2,11-14; Lûq 22, 66-71; 23,1-4;
Yû 18,28-38

15 Û sibê zû, serokên kahînan,
kalepîran û alimên zagonê
û hemûya Civata Netewî şêwirîn,
Îsa girêdan û wî birin dan destê
Pîlato. 2 Pîlato jî ji wî pirsî: Ma
tu qiralê Cihûdan î? Wî jî ber-
siv da û ji wî re got: Mîna ku tu
dibêje yî! 3 Serokên kahînan, bi
gellek tiştan wî tawanbar kirin.
4 Pîlato dîsa ji wî pirsî û got: Ma
tu qet bersivê nadî? Binêre, bi çi-
qas tiştan tawanbariyê li te dikin!
5 Lê belê êdî Îsa tu bersivê neda;
wusa ku, Pîlato şaş ma.

*Cezayê mirinê didin Îsa*

Met 27,15-26; Lûq 23,13-25;
Yû 18,39-40; 19,6-16

6 Wî di her cejnekî de girtiyekî ku
wan jê dixwestin, ji wan re berdi-
da. 7 Yekî bi navê Barabas hebû;
tevî dijrabirên di serî hildanê de
mirov kuştine, hatibû zincîr kirin.
8 Û gel derket cem wî û xwestin
ku mîna her demî bona wan yekî
berde. 9 Pîlato jî bersiv da wan û
got: Ma hûn dixwazin ku ez ji bo
we qiralê Cihûdan berdim? 10 Ji
ber, wî dizanibû ku serokên kahîn-
an ji ber çavnebariyê wî dane dest.
11 Lê belê serokên kahînan hîn
zêde ji bo wan Barabas bête ber-
dan, gel kişkişandin[4]. 12 Û Pîla-
to dîsa bersiv da û ji wan re got:
Wê çaxê ez çi bi wî zilamê bikim,
yê ku hûn jê re qiralê Cihûdan

1 Bang da.
2 Bang da.
3 Bang bide.
4 Tîz kirin, an jî: Fîtandin.

dibêjin? 13 Ew jî bi gotina: Wî
xaç bike! dîsa qêriyan. 14 Û Pîla-
to ji wan re got: Ma wî çi xerabiyê
kiriye ku? Lê ew jî bi gotina: Wî
xaç bike! hîn jî bi zêdeyî qêriyan.
15 Pîlatoyê dixwest ku dilê gel
razî bike, bona wan Barabas ber-
da û piştî ku Îsa da ber qamçiyan,
bona ku bê xaçkirin da.

*Tacê ji sincikan û qerfên Leşkeran*

Met 27,27-31; Yû 19,2-5

16 Leşkeran wî birin hindurê
qesrê ku navê wê Prêtoryûm[1] e
û hemûya tabûrê civandin. 17 Û
wan kincekî erxewanî li wî kirin û
ji sincikan tacekî çêkirin û dan ser
serê wî. 18 Û bi gotina: Bijî qiralê
Cihûdan! dest bi silavdana wî ki-
rin. 19 Û wan bi qamîşekî li serê
wî xistin û tûyî wî kirin û li ber
wî çok dan û ji wî re secde kirin.
20 Û piştî ku wan qerfê xwe bi wî
kirin, kincê mor ji wî kirin û dîsa
kincên wî lê kirin. Û bona ku wî
xaç bikin, derxistin derve.

*Xaçkirina Îsa*

Met 27,32-44; Lûq 23,26-43;Yû 19,17-27

21 Yekî bi navê Şîmûnê Kûrêneyî
tête nasîn, yê bavê Îskender û
Rûfûs bû û ji beyarê dihat û derbas
dibû, bona ku xaça Îsa bikişîne,
kirin suxrekar. 22 Û wan Îsa anîn
cîhê ku jê re Golgota tête gotin,
ku ger bête wergerandin, di mana
cîhê hestiyê serî de ye. 23 Û wan
xemra bi murê ve tevlihev dan wî,
lê belê wî ranehişt. 24 Û piştî ku
wan ew xaç kirin, bona ku ka çi ji
kê re dimîne pişkê avêtin[2] û kincên
wî di nava hev û din de par kirin.
25 Dema wî xaç kirin, saet sisê
bû. 26 Sûcê wî di yafta li ser wî
de: QIRALÊ CIHÛDAN hatibû
nivîsîn. 27 Û wan bi wî re, yek
li aliyê wî yê rastê û yek jî li yê
çepê, du rêbirî jî xaç kirin. 28 Bi
vî awayî nivîsa ku dibêje: Û ew bi
gunehkaran re hate jimartin, hate
cîh[3]. 29 Yên ji wir derbas dibûn,
kufr ji wî re dikirin û serê xwe di-
hejandin û digotin: Kanê teyê Pe-
restgehê xera bikira û di sê rojan
de ya nû ava bikira! 30 Ka ji xaçê
dakeve û xwe xelas bike! 31 Mîna
vê yekê serokên kahînan û alimên
zagonê jî henekê xwe bi wî dikirin
û di nava xwe de digotin: Kesên
din xelas kirin, nikare xwe xelas
bike! 32 Bila qiralê Îsraêlê Mesîh,
niha ji xaçê dakeve ku em bibînin
û bawer bikin! Yê bi wî re hatibûn
xaçkirin jî heqaretê li wî kirin.

*Mirina Îsa*

Met 27,45-56; Lûq 23,44-49; Yû 19,28-37

33 Gava saeta şeşan hat, tariyek
heta saeta nehan daket ser hemûya
erdê. 34 Di saeta nehemîn de Îsa,

---

[1] Qesra walî.
[2] An jî: Bona ka kî çi bistîne, ji kincên wî re vijag avêtin.
[3] Îşaya 53:9

bi dengekî bilind qêriya: Elohî,
Elohî, lama sabaxtanî? ku dema
bête wergerandin, tê wateya[1]:
Xwedayê min, Xwedayê min,
ma te çima min berda[2]? 35 Hin
kesên li wir sekinîbûn, dema vêya
bihîstin, gotin: A vay, ew bangî
Êlyas dike! 36 Yekî baz da û
sungerekî di sîrkê[3] de dakir û xist
serê qamîşekî û da wî ku vexwe û
got: Bihêlin, em bibînin, ka Êlyas
dê bê û wî bîne xwar? 37 Lê belê
Îsa bi dengekî bilind qêriya û ruhê
xwe da. 38 Û perda Perestgehê, ji
jor ve heta jêr çiriya û bû du perçe.
39 Gava serleşkerê ku li hemberî
Îsa disekinî, dît ku wî bi vî awayî
ruhê xwe da, got: Ev zilam bi rastî
Lawê Xwedê bû!
40 Li wê derê di nav pîrekên ku
ji dûr ve temaşe dikirin de, dema
ew hîn li Celîlê bû pîrekên li
pey Îsa çûbûn û xizmetê ji wî
re kiribûn; Meryema Mejdelanî
û Meryema diya Aqûpê biçûk
û Yosê û Şalomê 41 û gellek
pîrekên din jî, yên ku bi wî re
hatibûn Orşelîmê hebûn.

*Binaxkirina Îsa*

Met 27,57-61; Lûq 23,50-56; Yû 19,38-42

42 Û gava ku êdî bû êvar, ji ber
ku roja Amadekariyê, yanê roja
beriya Sebtê bû; 43 Ûsivê Arî-
matyayî yê endamekî birêz yê
Civata Netewî û bi hêvî li benda
Serweriya Xwedê bû hat, wêriya
û derket hizûra Pîlato û cesedê Îsa
xwest. 44 Pîlato, bi ewqas zû mi-
rina wî ve şaş ma, bangî serleşker
kir û jê pirsî: Mirina wî gellek bû?
45 Û dema ku wî rewşê ji serleşker
ve bihîst, cesed da Ûsiv. 46 Wî jî
cawekî keten stend û wî ji xaçê
daxist, bi caw ve pêça û bir go-
reke ji latê ve hatiye kolan danî
û kevirekî gindirand deriyê gorê.
47 Lê belê Meryema Mejdelanî û
Meryema diya Yosê dîtin ku ew li
ku derê danîn.

*Vejîna Îsa*

Met 28,1-8; Lûq 24,1-12; Yû 20,1-18

16 Û dema roja Sebtê derbas
bû, Meryema Mejdelanî û
Meryema diya Aqûp û Şalomê
çûn, bona ku li wî bidin biharatê
stendin.
2 Û di roja heftê ya pêşîn de si-
behê gellekî zû, gava ku roj hilat,
ew hatin gorê. 3 Û wan di nava
xwe de digotin: Ma kevirê di de-
riyê gorê de ye, dê kî bona me
bigindirîne? 4 Û dema ku wan
mêze kirin, dîtin ku ew kevirê
mezin gindiriye[4], ji ber ku ew
zehf mezin bû. 5 Û ew ketin gorê
û zilamekî qeftanê spî li xwe kirî,

1 Mane.
2 Zebûr 22:1
3 Sihik, sêk.
4 Gindirî bûye.

li aliyê rastê rûniştiye dîtin û pirr
şaş man. 6 Wî jî ji wan re got: Şaş
nebin! Hûn li Îsayê Nisretî yê ku
hatibû xaçkirin digerin, ew ji mi-
rinê rabûye; ew ne li vir e! A vay,
cîhê ku ew lê dirêjkirî bû! 7 Lê
belê hûn herin ji şagirtên wî re û ji
Pêtrûs re bibêjin: Ew berî we diçe
Celîlê; mîna ku ji we re gotibû,
hûn ê wî li wir bibînin! 8 Pîrek jî
ji gorê derketin û reviyan; ji ber
ku ricifandin û şaşiyek bi wan ve
ketibû; ji tu kesî re jî tiştekî nego-
tin; ji ber ku ditirsiyan.

*Îsa xuyayî Şagirtên xwe dibe*

Met 28,8-10; Lûq 24,13-43; Yû 20,11-29

9 Di roja heftê ya pêşîn de, sibê zû
dema ku Îsa vejiya, pêşiyê xuyayî
Meryema Mejdelanî bû, ya ku
heft cinan ji vê qewirandibû.
10 Ew jî çû û xeber da yên ku bi
Îsa re mabûn; wan şîn digirtin û
digiriyan. 11 Û gava wan bihîst
ku Îsa zindî[1] ye û xuyayî wê bûye,
pê bawer nekirin.
12 Piştî van tiştan, wî xwe bi
xuyangek[2] din nîşanî duduyan ji
wan da ku, ew derketibûn çolê û
dimeşiyan. 13 Ew çûn û xeberê
dan yên din; lê belê ew bi gotina
vana jî bawer nebûn.
14 Pişt re dema li sifrê rûniştibûn,
ew xuyayî Yanzdehan bû û bona
bêbaweriya wan û hişkbûna dilê
wan, ew şermezar kirin; ji ber bi
yên ku ew ji mirinê rabûyî dîtine
re, bawer nekiribûn.

*Îsa Şagirtên xwe dişîne hemûya dinê*

Met 28,16-20; Lûq 24,36-53;
Yû 20,19-23; K.Şa 1,6-12

15 Û wî ji wan re got: He-
rin hemûya dinê û Mizgîniyê
ji hemûya gerdûnê re bibêjin[3]!
16 Yê ku bawer bike û vaftîz
bibe, dê xelas bibe; lê belê yê ku
bawer neke, dê mehkûm bibe[4].
17 Şaneyên ku bi kesên bawer
bikin re xuya bibin ev in: Dê bi
navê min, cinan biqewirînin, dê
bi zimanên nû ve biaxifin, 18 dê
bi maran bigirin û rakin û ger ew
tiştekî ku bikuje vexwin, dê tu xe-
sarê[5] ji wê nebînin; dê destê xwe
deynin ser nexweşan û dê ew ê
qenc bibin.
19 Piştî ku Xudan Îsa van gotin-
an ji wan re got, bi ezmanê ve
hate girtin û li aliyê rastê Xwedê
rûnişt. 20 Ew jî derketin û li her
derê waz kirin û Xudan bi wan re
dişuxulî û kelamê bi nîşanên ku ji
paş ve tên tesdîq dikir.

---

[1] Dijî.
[2] Awayek, sûretek.
[3] Ji hemûya dinê re, an jî: Ji hemû afiran re bibêjin!
[4] Helaq bibe.
[5] Zirarê, ziyan.

# MIZGÎNIYA ÎSA MESÎH LI GOR LÛQA

MESÎHÊ XWEDÊ: LAWÊ MIROV

*Pêşgotin*

Ev pirtûka ku ji Nivîskar Lûqa re, di sala 80'yan de hatiye peyxam kirin, nivîsa Lûqa yî, ya di derheqê destpêk û belavbûna Baweriya Mesîh de yekemîn e. Ya dudan jî Karên Şagirtan e. Ev hekîm û dîrokzanê hunera wî yî nivîsê zehf xurt e, hatina Mesîh ya bona xelasiya mirovahiyê belavbûna baweriya ku peyxam dayê nivîsandiye. Armanca wî, bona baweriya xwendekaran bingehekî dîrokî û îspatiyan peyda kirin bû. Vêya bi pêşgotina xwe ve dide xuya kirin û pêşkêşî pêşhatekê demê, bi navê Têyofîlos e, dike (1:14). Lûqa di gerên Nûçevan Pawlos de, ji wî re rêhevaltî kiriye û tecrubeyên wî jî nivîsandiye. Karên Şagirtan 16:10; N. Kol. 4:14; N. Fîlêmon 24; 2.N.Tîmotêyos 4:11).

Lûqa, çîroka jiyana Îsa, bi lêgerîn û bedewiya pirr alî ve tîne ziman. Bi vê babetê ve xwar dibe û xwendevanan, ber bi derketina Civaka bawerkiran ya li rûyê erdê bedena Îsa ye dibe. Babeta bingeh ya Lûqa, Nûçeya Dilxweşkirinê a Xudan Îsa Mesîh ya xelasiya mirovan pêk tîne ye (4:17-19;19-10). Li vir Xwedê, Xelaskirê yê hatiye mirovahiyê xelas bike ye (22:19,20). Yê dilên nizm bilindtir dike û birçiyan bi tiştên xweş ve têr dike ew e (1:52,53). Lûqa qala donzdeh mûcîzetên Îsa jî dike. Mirov dikare vê nivîsa bi vî awayî kurt bike:

1. Destpêk û hatina Îsa 1:1-4:13
2. Destpêka xizmeta gel (bi taybetî li Celîlê) 4:14-9:50
3. Xizmeta gelî ya bi pirranî li Orşelîmê ve derbas bûyî 9:51-19:28
4. Bûyerên di derheqê xaçkirina Îsa de 19:29-23:55
5. Bûyerên paşî vejîna Îsa 24:1-53

1 Ya Têyofîlosê bixawên[1], gellekan dest bi dîroknivîsa ev
bûyerên ku di nava me de derbas
bûye kirine; 2 ew serpêhatiyên ku
wan kesên ji pêşî ve bi çavên xwe
dîtin û belav kirin ji me re gotine;
3 ji ber vê yekê, ez jî yekî ku ji
pêşiyê ve guhê xwe daye hemûyî
û lê kolayî me, ji lewre min qenc
dît ku ez wê rêz bi rêz ji te re binivîsim; 4 da ku, tu rastiya tiştên ku
ji te re hatine hînkirin, bizanî.

[1] Qedirbilind, xûypak, bifazîlet.

*Berî bûyîna wî, hatina Yehya tête*
*daxuyanî kirin*

5 Di dema qiralê Cihûstinê Hêro-
dês de, ji koma Ebiya, bi navê
Zekerya kahînek hebû; jina wî ji
keçên Harûn bû û navê wê Êlîza-
bêt bû. 6 Herdu jî li cem Xwedê
kesên salih bûn û di hemû emir
û daraziyên Xudan de bêqisûr
dimeşiyan. 7 Û zarokên wan tu-
nebû, ji ber ku Êlîzabêt stewr bû û
herdu jî gellek kal bûn.
8 Û wusa bû ku, gava wî di dora
koma xwe de li berya Xwedê
wezîfa xwe yî kahîntiyê dianî cîh;
9 li gor adeta kahîntiyê pişk li wî
ket ku ew here Perestgeha Xudan
û bixûrê bişewitîne. 10 Û di dema
şewitandina bixûrê de hemûya
civaka gel ji derve dua dikirin.
11 Di wê demê de milyaketek
Xudan, li aliyê rastê pêşkêşîgeha
bixûrê rawesta û xuyayî Zekerya
bû. 12 Û gava Zekerya ew dît,
şaş ma û tirs kete ser wî. 13 Lê
belê milyaket ji wî re got: Zeker-
ya metirse! Ji ber ku dua te hate
qebûl kirin û jina te Êlîzabêt, dê
kurekî ji te re bîne û tuyê navê wî
Yehya deyne. 14 Û tuyê kêfxweş
bibe û bicoşê ve bikeve; dê gellek
kes jî bi bûyîna wî kêfxweş bibin.
15 Ji ber ku ew dê li cem Xudan
mezin be, ew xemr û araqên giran
qet venaxwe û hîn di zikê diya
xwe de dê bi Ruhê Piroz tijî bibe.
16 Û ew ê gellekan ji lawên Îsraêl
ve vegerîne Xudan, Xwedayê
wan. 17 Bona ku dilê bavan berbi
zarokan ve û dijrabiran vegerîne
fêhmkariya salihan û bona ge-
lekî ji bo Xudan amade ye amade
bike, dê bi ruh û qudreta Êlyas
ve di pêşiya wî de bimeşe. 18 Û
Zekerya jî ji milyaket re got: Ez
çawa bi vêya bizanibim? Ji ber ku
ez zilamekî kalepîr im û pîreka
min jî zehf kalepîr e! 19 Û mil-
yaket bersiv da wî û ji wî re got:
Ez Cibrayîlê ku li ber Xwedê se-
kiniye me; ez hatime şandin ku, ji
te re bêjim û mizgîniya va tiştana
bidim te. 20 Û a vay, dê zimanê
te giran bibe û heta ku ev tişta çê
bibe, tuyê nikaribe biaxifî; ji ber
ku tu bi wan gotinên min yên dê
di demên xwe de bêne cîh bawer
nebû! 21 Û gel li benda Zekerya
bû û ew bi dereng mayîna wî ya
di Perestgehê de ecêb diman.
22 Lê belê Zekerya gava derket
derve, nikarîbû bi wan re biaxi-
fiya; wan fêhm kir ku di Perest-
gehê de xewn û xeyalekî dîtiye.
Û Zekerya ji wan re îşaretan kir
û zimanê wî lal ma. 23 Û wusa
bû ku, gava rojên wî yî xizmetê
derbas bûn, çû mala xwe.
24 Paşî wan rojan pîreka wî
Êlîzabêt ducanî ma û pênc meh vê
rewşa xwe veşart û got: 25 Xudan
rewşa min dît bona vê şermezariyê
di nava mirovan de ji ser min rake,
vê qencîtiya bi min re kir!

*Nûçeya ji Meryemê re tê gihîştin*

Îşa 7,14; Met 1,18-23

26 Di meha şeşemîn de, ji ali-
yê Xwedê ve, milyaket Cibrayîl,
li Celîlê, bajarê ku jê re dibêjin
Nisret; 27 ji keçikekê ku dergis-
tiya Ûsivê ji nîjada Dawid bû re
hate şandin; navê keçikê Meryem
bû. 28 Û milyaket hat cem wê û
ji wê re got: Silav li te, ya keçi-
ka xêr dîtî; Xudan bi te re ye! 29
Û Meryem bi vê gotinê ve gellek
şaş ma û difikirî ku, ka ev silava
tê çi wateyê[1]. 30 Û milyaket ji wê
re got: Meryem, metirse! Ji ber ku
tu gîhaşt xêra Xwedê. 31 Û a vay,
tuyê ducanî bimîne, lawekî bîne
dinê û navê wî Îsa deyne. 32 Ewê
mezin bibe û dê ji wî re bibêjin;
Lawê Yê Herî Bilind, dê Xudan,
Xwedê texta bapîrê wî Dawid
bide wî 33 û dê heta bêdawiyê li
ser mala Aqûp serweriyê bajo û dê
qet dawiya serweriya[2] wî tune be.
34 Meryemê jî ji milyaket re got:
Gelo dê ev çawa bibe; ji ber ku ez
bi zilam nizanim? 35 Û milyaket
bersiv da û ji wê re got: Dê Ruhê
Pîroz were ser te û Yê Herî Bilind,
siya xwe bi ser te ve berde; ji ber
vê yekê, dê ji wî Pîrozê ku biwe-
lide re, Lawê Xwedê bête gotin.
36 Û a vay, meriva te Êlîzabêt jî
di pîraniya[3] xwe de bi lawekî ve
ducanî ma û pîreka ku ji wê re di-
gotin stewr e, a vay, ew di meha
xwe yî şeşemîn de ye. 37 Ji ber
ku, li cem Xwedê tiştekî nebe tune
ye. 38 Meryemê jî got: A vay, ez
xizmetkara Xudan im; bila bona
min, mîna gotina te bibe! Û mil-
yaket ji wê cûda bû.

*Meryem diçe ba diya Yehya*

39 Meryem rabû, di wan rojan
de bi lez çû bajarekî ji herêma
çiyayiya Cihûda. 40 Û ew gîhaşt
mala Zekerya û silav da Êlîzabêtê.
41 Û wusa bû ku, gava Êlîzabêt
silava Meryemê bihîst, zarokê di
zikê wê de xwe tev da û Êlîzabêt
bi Ruhê Pîroz ve tijî bû 42 û bi
dengekî bilind bang kir û got:
Tu ya di nava pîrekan de pîroz
e, dexla zikê te jî pîroz e! 43 Û
ev ji min re ji ku ve bû ku, diya
Xudanê min hate cem min? 44 Ji
ber ku gava dengê silava te kete
guhê min, zarokê di zikê min de
bi kêfxweşî xwe tev da. 45 Xwezî
bi wê pîreka ku bawerî anî! Ji ber,
ew tiştên ku ji aliyê Xudan ve jê
re hatine gotin, dê bên cîh!

*Qesîdeya Meryemê*

1. Sam 2,1-10

46 Û Meryemê got: Canê min
Xwedê bilindtir dike 47 û ruhê

1 Manê.
2 Qiraliya.
3 Jinepîritiya.

min bi Xelaskarê min Xwedê ve
şa dibe; 48 ji ber ku, li rewşa kêm
ya qûlê xwe ve nihêrt; lewma a
vay, ji niha pê ve dê hemû nifşe ji
min re; dilgeş[1]! bibêjin. 49 Ji ber
ku yê bi Qudret ji min re tiştên
mezin kir; navê wî pîroz e. 50 Û
dilovaniya wî, nifş bi nifş li ser
yên ku ji wî ditirsin e. 51 Wî bi
hêza bazindê xwe serweriyê pêk
anî; yên di nava pêşniyarên dilê
xwe de xwe mezin dibînin, ji hev
belav kirin. 52 Wî yên mezin, ji
textên wan anî xwar û yên nizm
bilind kir. 53 Birçiyan bi tiştên
xweşik ve têr kir û dewlemendan
dest vala şand. 54 Wî bîranîna
dilovaniya xwe kir, alîkariyê bi
xulamê xwe Îsraêl re kir. 55 Mîna
ku ji bapîrên me re; ji Birahîm û
nîjada wî re heta bêdawiyê soz
daye! 56 Meryem qasî sê mehî li
mala Êlîzabêtê ma û dîsa vegeriya
mala xwe.

*Bûyîna Yehya*

57 Ji bo Êlîzabêtê, dema ku biwe-
lidîne temam bû û wê lawekî anî.
58 Cîran û mirovên wê bihîstin
ku Xudan dilovaniyek mezin li
wê kiriye, bi wê re kêfxweş bûn.
59 Û wusa bû ku, di roja heyştemîn
ya bûyîna lawik de, bona sunet-
kirinê hatin û xwestin ku li gor
navê bavê wî Zekerya li wî bikin.
60 Diya wî li wan vegerand û got:
Na, lê belê dê navê wî Yehya be!
61 Û wan ji wê re gotin: Di nav
mirovên te de kesekî bi vî navî
tune ye! 62 Li ser vêya, vegeriyan
ser bavê wî û bi nîşanan ve ji wî
pirsîn ku, ka ew dixwaze çi navî
li lawik bike. 63 Wî lewheyek
xwest û li ser nivîsî: Navê wî
Yehya ye! Hemû ecêb man. 64 Di
cîh de dev û zimanê wî vebûn û
gotinên ku Xwedê bilindtir dikin
got. 65 Û tirs ket ser hemûyên ku
li dorê rûniştî bûn û hemûya van
gotinan, li hemû herêma çiyayiya
Cihûdayê ve hatin axaftin. 66 Û
heçî kesên bûyerê bihîstin digo-
tin: Gelo dê ev zaroka bibe çi? Ev
tiştana di dilê xwe de veşartin; ji
ber ku destê Xudan bi wî re bû.

*Qesîdeya Zekerya*

67 Û bavê wî, Zekerya bi Ruhê
Pîroz ve tijî bû û bi vî awayî pey-
xamberîtî kir û got:
68 Bila Xwedayê Îsraêlê Xudan
pîroz be! Ji ber ku serîdankê li ne-
tewa xwe kir û bi fîdyê xelas kir.
69 Em ji destên neyarên xwe ve
xelas bûn 70 û bona ku di hemû ro-
jên me de bi pîrozî û qenciyê ve, li
ber wî, bi bêtirsî parastinê ji me re
bibexşîne, 71 bona ku ji bavên me
re dilovaniyê bike û peyxama xwe
ya pîroz, 72 bona sonda ku ji bavê
me Birahîm re daye di bîra xwe de
bîne, 73 wekî ku ji destpêkê ve bi

[1] Dilşad, bextiyar.

devê peyxamberên xwe yî pîroz ve
gotiye, 74 ji destê neyarên me û ji
hemûyên ku ji me dikerihin ve xe-
lasiyê, 75 di mala qûlê xwe Dawid
de, ji me re hêza xelasiyê bilind kir.
76 Û tu jî, ya zarok, tuyê bi navê
peyxamberê Yê Herî Bilind bête
bang kirin; ji ber, bona ku tu rêyên
wî amade bike 77 û bona têgihan-
dina xelasiya ku bi bexşandina
gunehên netewa wî ve dibe; tuyê
li ber rûyê Xudan bimeşe; 78 ji
ber zêdeyiya dilovaniya Xwedayê
me, bona ku ronahiyê bide yên
ku di tariyê de û di siya mirinê de
rûniştine, 79 bona ku lingên me
berbi rêya xweşiyê ve rast bike,
roja ku hiltê dê ji bilindahiyan ve
were serîdanka me!
80 Zarok mezin dibû û ji aliyê ruh
ve xurt dibû û heta roja ku ji Îs-
raêlê re bête daxuyanîkirin di ço-
lan de ma.

*Bûyîna Îsa Mesîh li Beytlehemê*
Met 1,18-25

2 Û wusa bû ku, di wan rojan de
Qeyser Awgûstos emir da ku
bila hemû gelên dinê navên xwe
bidin nivîsandin. 2 Ev jimartina
yekemîn, di dema ku Kûrênyo
waliyê Sûriyê bû de dibû[1]. 3 Û her
kes bona ku xwe binivîsînin, çûn
bajarên xwe. 4 Ûsiv jî ji bajarê
Nisretê ya herêma Celîlê çû Beyt-
lehemê bajarê Dawid li Cihûs-
tanê; ji ber ku ew ji mala Dawid û
ji nîjada wî bû; 5 ew çû wê derê,
bona ku xwe bi dergistiya xwe
Meryemê re bide nivîsandin; der-
gistiya wî jî ducanî bû. 6 Û wusa
bû ku, gava ew li wê derê bûn,
dema welidandina wê hat. 7 Û wê
lawê xwe yî yekemîn welidand;
bi pêçekê ve pêça û wî di afirekî
de razand, ji ber ku di xanê de cîh
ji wan re tune bû.

*Şivan û Milyaketan*

8 Û li wê herêmê şivan hebûn;
bi şev li çolê li ber keriyên xwe
diman û bi nobedarî çavnêriyê li
keriyên xwe dikirin. 9 Û a vay,
milyaketekî Xudan ji wan re
xuyanî bû û rewnaqiya Xwedê
çar hawirdorên wan kir ronahî
û ew zehf tirsiyan. 10 Û milya-
ket ji wan re got: Metirsin! Ji ber
ku a vay, ez mizgîniya şabûneke
mezin didim we, ew ê ji hemûya
gel re be. 11 Ji ber ku îro li ba-
jarê Dawid, Xelaskerek ji we re
welidiye; ew jî Xudan Mesîh e.
12 Bila ev ji we re bibe nîşan: Hûn
ê zarokekî di pêçekê de pêçayî û
di afirekî de razayî bibînin. 13 Û
ji nişka ve bi milyaket re, civa-
tek ji artêşa ezman; pesnê Xwedê
dan û gotin:
14 Bila li bilindahiyan ji Xwedê
re rûmet li rûyê erdê ji mirovên ku
ew jê raziye re dilxweşî be!

*1* Dihat çêkirin.

15 Û wusa bû ku, gava milyake-
tan ji dora wan ve hilkişiyan ez-
man, şivanan ji hev û din re gotin:
Werin, em heta Beytlehemê herin
û vê bûyera ku Xudan daxuyani-
yî me kir bibînin! 16 Û ew bi lez
hatin, Meryem, Ûsiv û zarokê di
afirê de razayî dîtin. 17 Û gava
dîtin, gotina ku di derheqê vî
zarokî de ji wan re hatibû gotin
têgîhandin. 18 Û hemûyên ku ev
nûçeya ji şivanan ve bihîstin, ecêb
man. 19 Lê belê Meryemê ev go-
tinana hemû di dilê xwe de dihişt
û kûr pê difikirî. 20 Û şivan vege-
riyan û mîna ku ji wan re hatibû
gotin, bona hemû tiştên ku dîtine
û bihîstine, şikiryê ji Xwedê re ki-
rin û pesnê wî didan.
21 Û gava heyşt roj qediyan, wî
sunet kirin û mîna milyaket, berî
ku ew bikeve zikê diya xwe go-
tibû, navê Îsa li wî kirin.

*Îsa tînin Perestgehê*

22 Û dema li gor zagona Mûsa, roja
pakbûnê[1] hat, wî birin Orşelîmê
ku wî pêşkêşî Xudan bikin.
23 Mîna ku di zagona Xudan de
hatiye nivîsîn: Her zarokê nêr yê
ku pêşiyê bûyiye, dê ji bona Xudan
pîroz bê hesibandin[2]. 24 Û cotek
kevokên qumrî, an jî du çêlikên
kevokan[3] pêşkêş bikin; mîna ku
di zagona Xudan de hatiye emir
kirin[4].

*Şîmeûn peyxambertiyê dike*

25 Û a vay, li Orşelîmê, bi navê
Şîmeûn mirovek hebû; gellekî rast
bû ji Xwedê titirsiya; ew li hêviya
dilgeşiya Îsraêlê bû û Ruhê Pîroz li
ser wî bû. 26 Û Ruhê Pîroz bi wî
dabû zanîn ku, berî dîtina Mesîhê
Xudan, ew dê mirinê nebîne.
27 Û bi rêberiya Ruh ve ew hate
Perestgehê; gava dayik û bavê wî,
ji bo wî yê ku li gor zagonê kirina
wê adet e bikin; Îsayê zarok anîn
Perestgehê; 28 Şîmeûn wî rahişt û
girt himbêza xwe, bi bilindtir kirina
Xwedê ve vana got: 29 Ya Xudan;
niha li gor soza xwe, tuyê qûlê xwe
bi dilxweşî berde! 30 Ji ber ku ça-
vên min, ronahiya ku te li ber ça-
vên hemû neteweyan amade kiriye,
31 ya ku dê gelan[5] ronahî bike 32 û
xelasiya ku bilindahiya gelê te Îs-
raêlê ye, dîtin! 33 Û Ûsiv û dayika
wî, ji tiştê ku bona wî dihatin gotin
ecêb man. 34 Û Şîmeûn wan pîroz
kir û ji diya wî Meryemê re got: A
vay, ev zaroka li Îsraêlê bona ketin
û rabûna gellekan û nîşaneke li dijî
wî derketinê hatiye danîn e; 35 dê
şûrekî dilê te jî qul û derbas bike;
da ku, bila ramanên dilên gellekan
bên eşkere kirin.

[1] (3.Mûsa 12:2-6)
[2] (2.Mûsa 13:2, 12)
[3] (3.Mûsa 12:8)
[4] Daxuyanî kirin.
[5] Hemû gelê xeyni netewa Îsraêlê.

36 Û li wê derê peyxamberek bi
navê Hana hebû ku, zehf kal bû;
ew qîza Fanowêl û ji bavikê Aşer
bû û piştî keçikaniya xwe heft salî
bi zilamê xwe re mabû 37 û piştî
wê heyştê û çar salî jinebî mabû;
wê dev ji Perestgehê ve bernedida
û bi şev û roj, bi rojî û duayan (ji
Xwedê re) peristinê dikir. 38 Û ew
jî hema di wê saetê de hat, pesnê
Xwedê da û wê li ser wî ji hemûyên
ku li hêviya xelaskirina Orşelîmê
bûn re got.

*Vergera Nisretê*

Met 2,22-23

39 Û gava wan her tiştî li gor
zagona Xudan pêk anîn, vege-
riyan bajarê xwe Nisreta Celîlê.
40 Zarok mezin dibû, xwurt û bi
zanyariyê ve tijî dibû; qenciya
Xwedê jî li ser wî bû.

*Zaniyariya Îsa*

41 Û dayik û bavê wî, her sal di
Cejna Fisihê de diçûn Orşelîmê.
42 Û gava ew kete sala donzde-
han, li gor adeta cejnê hilkişiyan
Orşelîmê. 43 Û piştî ku wan ro-
jên cejnê qedandin û vegeriyan
mal, Îsayê zarok li Orşelîmê ma;
hayê Ûsiv û dayika wî bi vêya tu-
nebû. 44 Di bi gûmana ku ew di
nav rêhevalan de yî, rêya rojekî
meşiyan; di nav meriv û hevalan
de li wî digeriyan. 45 Û gava wan
ew nedîtin, vegeriyan Orşelîmê û
li wî geriyan. 46 Û wusa bû ku,
piştî sê rojî wî di Perestgehê de
dîtin; ew di nav mamosteyan de
rûniştîbû, guh dida wan û pirs ji
wan dikir. 47 Hemûyên ku go-
tinên wî dibihîstin, li fêhmkarî û
bersivên wî şaş diman. 48 Û gava
ku wan ew dîtin, şaş man û diya
wî ji wî re got: Ya law, te çima
ûsa li me kir? A vay, bavê te û
ez di nava êşan de li te digeri-
yan! 49 Û wî ji wan re got: Çima
hûn li min digeriyan? Ma we ni-
zanîbûn ku, divê ez li mala Bavê
xwe bim? 50 Lê belê wan wateya[1]
gotinên ku wî ji wan re got, fêhm
nekirin. 51 Û ew bi wan re daket
û hate Nisretê û ji wan re bû îtaet-
ker. Û diya wî jî hemû ev gotinana
di dilê xwe de vedişart. 52 Û Îsa
bi zanînê û ji aliyê bejnê ve pêş ve
diçû; li ber Xwedê û li ber miro-
van dilovan û giranbuha dibû.

*Belavoka Yehya*

Met 3,1-12; Marq 1,1-8; Yû 1,6-8,19-28

3 Lê belê di sala panzdehên qi-
raletiya Qeyser Tîberyos de,
gava ku Pîlatosê Pontiyûsê, wa-
liyê Cihûstanê bû, Hêrodês ser-
darê[2] Celîlê bû û birayê wî Fîlîpo
serdarê herêma Îtûrêya û Tra-
xonîdayê bû û Lûsanyûs serdarê

1 Mane.

2 Mîrê ku serwerê ji çar parî pariyekî welêt.

Abîlîneyê bû, 2 Hena û Qayafa
Serokkahîn bûn; di wê demê de
gotina Xwedê li çolê ji Yehyayê
lawê Zekerya re hat.
3 Û ew jî li seranserê Çemê Ur-
dunê ji bo bexşandina gunehan
bi toba vaftîzê waz dayînê ve hat.
4 Çawa ku di Pirtûka gotinên Îşaya
Peyxamber de hatiye nivîsandin:
Dengê yê li çolê bang dike: Rêya
Xudan amade bikin û şiverêyên
wî rast bikin! 5 Dê her gelî tijî
bibin, dê her çiya û gir nizm bi-
bin û yên çewt dê bên rastkirin û
rêyên zaxor dê bên rastkirin 6 û
dê her mirov xelaskariya Xwedê
bibînin[1].
7 Niha, wî ji ajaweyên dihatin ku ji
aliyê wî ve bên vaftîz kirin re got:
Hey çêlikên koremaran, kê ji we
re gotiye ku hûn ji ber vê xezeba
ku tê baz bidin? 8 Niha fêkiyên ku
liyaqî tobê ne, bidin! Û di hundirê
xwe de dest pê nekin û nebêjin: Bi-
rahîm bapîrê me ye; ji ber ez ji we
re dibêjim ku, Xwedê dikare ji van
keviran zarokan ji Birahîm re rake.
9 Jixwe bivir jî li ser rehên daran e.
Her dara ku berê qenc nede, dê bê
birîn û bê avêtin nav êgir!
10 Û gel jî ji wî pirsî û got: Wê
demê divê em çi bikin? 11 Wî ber-
siv da û ji wan re got: Yên ku du
kirasên wî hebin, bila bide yê ku yê
wî qet nîne û bila kesê ku xwarina
wî hebe jî ûsa bike! 12 Wê demê
karmendên bacê[2] jî hatin ku vaftîz
bibin û gotin: Ya mamoste, ma em
çi bikin? 13 Wî ji wan re got: Ji
tiştên ku hewce dike hûn bistînin
zêdetir nestînin! 14 Leşkeran jî ji
wî pirsîn û gotin: Wê demê divê
em çi bikin? Û wî jî ji wan re got:
Bêbextiyê li tu kesî mekin û bi
darê zorê tiştekî ji wan nestînin û
bi heqdestên xwe ve razî bin!
15 Ji ber ku gel di nava hêviyê de li
bendê bûn, bona Yehya hemûyan di
dilên xwe de dipirsîn: Gelo Mesîh
ev e? 16 Yehya bersiva hemûyan
bi van gotinan ve da: Rast e, ez bi
avê we vaftîz dikim; lê yê ji min
ve biquwettir tê ku, ez ne hêja me
benikên çaroxên wî vekim; ew ê
bi Ruhê Pîroz û bi agir we vaftîz
bike. 17 Melhêba wî di destê wî
de ye ku, bêndera xwe paqij bike
û genim bixe embara xwe, lê belê
ew ê kayê bi agirekî qet venamire
ve bişewitîne!
18 Wî, bi şîret kirina gellek tiştên
din jî ji gel re Mizgînî waz dida.
19 Lê belê, ji ber ku Hêrodêsê
serdar, ji ber jinbira xwe Hêrodiya
û ji ber hemû xerabiyên ku Hêro-
dês kiribû; ji aliyê Yehya ve ha-
tibû azirandin, 20 li ser hemûyên
vana, wî avêt girtîgehê.

[1] Îşaya 40:3-4

[2] Cihûyên ku bona serwerên biyan, Romiyan bacê (bêşê) didan hev.

*Vaftîzbûna Îsa*

Met 3,13-17; Marq 1,9-11; Yû 1,32-34

21 Û wusa bû ku, gava hemûya
gel dihatin vaftîz kirin, Îsa jî hate
vaftîz kirin û dema dua dikir ez-
man vebûn 22 û Ruhê Pîroz bi
beden di şiklê kevokekê de li ser
wî danî û dengek ji ezmanan hat û
got: Lawê minî xoşewîst tu yî; ez
ji te razî me!

*Nîjada Îsa*

Met 1,1-17; K.Şa 13,23

23 Û Îsa dema dest bi wezîfeya
xwe kir, nêzîkî sî salî bû û wek ku
dihat gûman kirin, ew lawê Ûsiv,
lawê Elî, 24 lawê Metat, lawê
Lêwî, lawê Melkê, lawê Yannay,
lawê Ûsiv, 25 lawê Metîtya, lawê
Amos, lawê Nehûm, lawê Hes-
lî, lawê Neggay, 26 lawê Mehat,
lawê Metîtya, lawê Şemeyîn,
lawê Yûsex, lawê Yoda, 27 lawê
Yûhenan, lawê Rêşa, lawê Zerû-
babel, lawê Şaltiyêl, lawê Nerî,
28 lawê Melkê, lawê Êdî, lawê
Qosam, lawê Êlmedam, lawê Er,
29 lawê Yêşû, lawê Êliyazêr, lawê
Yorîm, lawê Metat, lawê Lêwî,
30 lawê Şîmeûn, lawê Cihûda,
lawê Ûsiv, lawê Yonam, lawê
Êlyaqîm, 31 lawê Melyo, lawê
Mena, lawê Metêta, lawê Natan,
lawê Dawid, 32 lawê Îşay, lawê
Obêd, lawê Boaz, lawê Selmon,
lawê Nehşon, 33 lawê Amînadab,
lawê Admîn, lawê Aram, lawê
Hesrûn, lawê Pêrez, lawê Cihûda,
34 lawê Aqûp, lawê Îshaq, lawê
Birahîm, lawê Têrah, lawê Nehor,
35 lawê Serûx, lawê Rêwo, lawê
Pêlêg, lawê Eber, lawê Şalah,
36 lawê Kenan, lawê Arpexşad,
lawê Sem, lawê Nûh, lawê Lamex,
37 lawê Metûşela, lawê Henox,
lawê Yarêd, lawê Mehalêl, lawê
Kenan, 38 lawê Enoş, lawê Sêt,
lawê Adem, lawê Xwedê bû.

*Ceribandina Îsa*

Met 4,1-11; Marq 1,12-13

4 Îsa bi Ruhê Pîroz ve tijî bûyî,
ji Urdunê vegeriya û ji aliyê
Ruh ve berbi çolê ve hate şandin.
2 Ew çel rojî, ji aliyê Îblîs ve hate
ceribandin. Wî di wan rojan de
tiştekî nexwar û gava ew rojan
derbas bûn, ew birçî bû. 3 Û Îblîs
ji wî re got: Ger tu Lawê Xwedê
yî, ji vî kevirî re bibêje, bila bibe
nan! 4 Û Îsa bersiv da wî û got:
Hatiye nivîsandin ku: Mirov tenê
bi nan ve najî[1]!
5 Û Îblîs wî derxist ser çiyayekî
bilind û di hilmekê de hemû
welatên rûyê erdê nîşanî wî da.
6 Û Îblîs ji wî re got: Ez ê hemûya
vê rayedariyê û mezinahiya vana
bidim te; ji ber ku ev ji min re
hatine dayîn û ez bixwazim, dilê
min ji kê re bixwaze, karim bi-
dim wî. 7 Niha ger tu li ber min

1 (5.Mûsa 8:3)

secde bikî[1], dê hemû bibin yên te!
8 Û Îsa bersiv da wî û got: Hati-
ye nivîsandin ku: Tuyê ji Xudan,
Xwedayê xwe re peristinê bikî û
tenê ji wî re qûlitiyê bikî[2].
9 Û Îblîs wî bir Orşelîmê û danî
ser birca Perestgehê û ji wî re got:
Ger tu Lawê Xwedê yî, ka xwe ji
vir bavêje xwarê; 10 ji ber ku hati-
ye nivîsandin: Ew ê di derheqê te
de ji milyaketên xwe re, bona ku
te biparêzin emir bike 11 û: Ew ê
te li ser destên xwe ragirin, bona
ku tu lingên xwe li kevirekî nexe[3].
12 Û Îsa bersiv da û ji wî re got:
Tuyê Xudan, Xwedayê xwe nece-
ribîne[4]! hatiye gotin. 13 Û dema
Îblîs hemû ceribandinên xwe qe-
dand, bona demekê ji wî dûr ket.

*Destpêka xizmetê*

Met 4,12-17; Marq 1,14-15

14 Û Îsa bi quweta Ruh ve vegeri-
ya Celîlê û li hemûya herêmê nav
û dengê wî belav bû. 15 Û wî di
kenîştên wan de dida hînkirinê û
hemûyan pesnê wî didan.

*Bajarê Nisretê Îsa qebûl nake*

Met 13,54-58; Marq 6,1-6

16 Û ew hat bajarê Nisretê, ya ku
ew li wir mezin bûbû; li ser adeta
xwe, di roja Sebtê de kete kenîştê
û bona xwendinê rabû ser pêlan.
17 Û pirtûka Îşaya peyxamber dan
wî û gava wî pirtûka li hev pêçayî
vekir, wî cîhê ku tê de ûsa hatibû ni-
vîsîn dît: 18 Ruhê Xudan li ser min
e; ji ber, bona ku ez Mizgîniyê ji
xizanan re waz bidim; wî min mesh
kir, wî min, bona ku ez ji dîlan re
azadbûnê û ji koran re vekirina
çavên wan bang bikim, bindestan
bighînim xelasiyê 19 û bona ku
sala Xudan ya meqbûl bidim bang
kirin, şandiye[5]. 20 Û wî pirtûkê
li hev pêça, wê da destê berdestî
û rûnişt; çavên hemû kesên ku di
kenîştê de bûn, li wî bûn.
21 Û wî dest pê kir û ji wan re got:
Îro ev nivîsîna ku we bihîstin, hat
cîhê xwe! 22 Û hemûyan bona wî
şahdeyiyê dikirin û bi gotinên wî
yî bixêr, yên ku ji devê wî derdi-
ketin ecêb mayî diman û digotin:
Ma ev ne lawê Ûsiv e?
23 Û wî ji wan re got: Bi rastî hûn ê
vê metheloka ji min re bibêjin: Ya
hekîmo, ka xwe bi xwe qenc bike!
Ka wan hemû tiştên me bihîstine,
yên ku te li Kefernahûmê kirine,
li vê derê jî, li nav welatê xwe jî
bike! 24 Û Îsa got: Bi rastî ez ji
we re dibêjim: Qet peyxamberek
di welatê xwe de nayê qebûl ki-
rin. 25 Lê belê ez ya rast ji we re
dibêjim ku: Gellek jinebî di rojên
Êlyas de li welatê Îsraêlê hebûn,

[1] An jî: Ger tu ji min re secde bikî.
[2] (5.Mûsa 6:13)
[3] Zebûr 91:11-12
[4] (5.Mûsa 6:16)
[5] Bidim naskirinê. Îşaya 61:1-2

çaxê ku ezman sê sal û şeş meh
hatibû girtin û di hemûya welat de
xelayeke mezin rabûbû 26 û Êlyas
ji wan tu kesî re nehat şandin; tenê
ji Sarefata li warê Saydayê, ji jine-
biyekê re hate şandin. 27 Û gellek
kesên bi cizamî di dema Êlîşa pey-
xamber de li welatê Îsraêlê hebûn
û ji nav wan ji Naamanê Sûrî pê
ve qet kesekî din nehat paqij kirin.
28 Û dema kesên di kenîştê de van
tiştan bihîstin, hemû bi hêrs ve tijî
bûn. 29 Û ew rabûn ser xwe û wî
ji bajêr ve derxistin derve û birin
ser keviya çiyayê ku bajarê wan li
ser hatibû avakirin ku, bo wî ji wê
derê bavêjin xwarê. 30 Lê belê ew
ji nav wan ve derbas bû û çû.

*Mirovê cinokî*

Marq 1,21-28

31 Û ew daket Kefernahûmê, ya
ku bajarekî Celîlê ye û di roja
Sebtê de ji wan re fêr dikir[1]. 32 Û
ew bi hînkirina wî ecêbmayî man;
ji ber ku gotina wî, bi rayedariyê
ve bû. 33 Û di kenîştê de zilamek
hebû û ruhê cinekî xerab di wî de
bû û wî bi dengekî bilind kir qêrîn
û got: 34 Ya Îsayê Nisretî, me
berde! Ma tu çi ji me dixwazî? Ma
tu bona tunekirina me hatiyî? Ez
dizanim tu kî yî, tu Pîrozê Xwe-
dê yî! 35 Û Îsa emir da wî û got:
Devê xwe bigire û ji wî derkeve!
Cin wî mirovî di nav hemûyan de
avêt erdê, ji wî derket û xesarekê
neda wî. 36 Û hemû ecêb man û
di nav hev de axifîn û gotin: Gelo
ev çi gotin e, ji ber ku ew bi hêz
û rayedariyê emir dide ruhên xe-
rab û ew jî derdikevin? 37 Û nav
û dengê wî, li her derê wê herêmê
belav bû[2].

*Îsa gellek nexweşan baş dike*

Met 8,14-17; Marq 1,29-39

38 Îsa ji kenîştê derket û çû mala
Şîmûn. Xwesiya Şîmûn bi tayekê
giran ketibû û ji bo wê li ber wî ge-
riyan. 39 Îsa li ber serê wê sekinî
û bi tayê ve pekiya û ta ji wê çû û
pîrek hema rabû ser xwe û xizmetê
ji wan re kir. 40 Û gava roj çû ava,
hemûyan nexweşên xwe, yên bi
nexweşiyên tewr bi tewr ketibûn
anîn cem wî; Îsa jî destên xwe danî
ser her yekî ji wan û wan baş kir.
41 Û ji gellekan jî cin derdiketin,
dikirin qêrîn û digotin: Tu Lawê
Xwedê yî! Ew bi wan ve dipekiya
û nedihişt ku bibêjin, ji ber ku wan
dizanîbûn ku ew Mesîh e.

*Îsa danasîna Xwedê dide nasîn*

Marq 1,35-39

42 Û dema bû roj, ew derket û çû
cîhekî tenha; gel jî li wî digeriyan

1 An jî: Li wan dida hînkirinê.

2 An jî: Nûçeya di derheqê wî de, li her derê wê herêmê belav bû.

û hatin heta cem wî û wan dixwes-
tin bi wî bigirin ku wan bernede
û neçe. 43 Lê belê Îsa ji wan re
got: Divê ez Mizgîniya Serweri-
ya Xwedê bidim bajarên din jî,
ji ber ku ez bona vê yekê hatime
şandin. 44 Û wî di kenîştên Celîlê
de waz dida.

*Îsa bangî Şagirtên xwe yî pêşiyê dike*

Met 4,18-22; Marq 1,16-20;
Yû 1,35-51; 21,1-11

5 Û wusa bû ku, rojekê gava Îsa
li ber devê gola Cênîsartê se-
kinî bû, gel li dor wî ve civiyabûn
ku gotina Xwedê bibihîzin 2 û wî
li qeraxa golê du lotke dît; lê belê
masîgir ji wan ve peya bûbûn û
torên xwe dişuştin. 3 Îsa li lotkekê
ji wan siwar bû; ew jî ya Şîmûn bû
û ji wî xwest ku hinekî ji qeraxê
ve bi dûr bixe û ew rûnişt, ji lotkê
dest bi hînkirina gel kir. 4 Gava
ku wî gotinên xwe xelas kir, ji
Şîmûn re got: Bi kûrayiyê ve bajo
û torên xwe, bona nêçîrê bavêjin!
5 Û Şîmûn li wî vegerand û got:
Mamoste; hemûya şevê me kir û
nekirin, tu tiştî negirtin; lê belê li
ser gotina te ez ê toran bavêjim!
6 Û gava wan ûsa kirin, ewqas
masî girtin ku, torên wan dest bi
çirînê kirin. 7 Û wan bi nîşanan
bang şirîkên xwe, yên ku di lotka
din de ne, kirin ku werin û alîka-
riyê bi wan re bikin. Ew jî hatin
û herdu lotke ewqas dagirtin ku
hindik mabû noq bibûna. 8 Lê
belê gava Şîmûn Pêtrûs vêya dît,
wî xwe avêt ber çongên Îsa û got:
Ya Xudan, ji min dûr bikeve, ji
ber ku ez mirovekî gunehkar im!
9 Ji ber ku ew û kesên bi wî re
bûn, ji pirrbûna masiyên ku gir-
tibûn, ecêb mabûn. 10 Aqûp û
Yûhena yên Lawên Zebedî ne,
yên ku şirîkên Şîmûn bûn, ew jî
di nav wan de bûn. Û Îsa ji Şîmûn
re got: Metirse! Ji niha pê ve tuyê
bibî nêçîrvanê mirovan! 11 Û pişt
re wan lotkeyên xwe kişandin
qeraxê û dev ji her tiştî berdan û
li pey wî çûn.

*Îsa yekî bi cizamî pak dike*

Met 8,1-4; Marq 1,40-45

12 Û wusa bû ku, gava ew li nav
bajarekî ji bajaran bû, a vay, li wir
mirovekî bi cizamê ve tijî hebû û
gava wî Îsa dît, bi ser devî xwe
avêt erdê, li ber wî geriya û ji wî
re got: Ya Xudan, ger tu bixwaze,
tu dikarî min paqij bikî! 13 Û Îsa
destê xwe dirêj kir, dest pê da û
got: Ez dixwazim, paqij bibe! Û
cizam hema ji wî çû.
14 Û Îsa emir da wî ku, bila ew
ji kesekî re nebêje: Lê belê here,
xwe nîşanî kahîn bide û mîna
ku Mûsa emir daye[1] qurbanekê
bide, bila ji wan re bibe şahdeyî
ku tu paqij bûyî! 15 Lê belê dîsa

[1] (3.Mûsa 14:2-22)

jî nav û dengê wî hîn jî bêtir
belav bû û gellek ji gel li hev
diciviyan, bona guhdariya wî
bikin û ji nexweşiyên xwe baş bi-
bin. 16 Lê belê wî xwe da cîhekî
tenha û dest bi duayê kir.

*Îsa mirovekî kûd baş dike*

Met 9,1-8; Marq 2,1-12

17 Û wusa bû ku, rojekê dema Îsa
dida hînkirinê, Fêrisî[1] û alimên
zagonê[2] li wir rûniştibûn; ew ji
her gundên Celîlê û Cihûstanê û ji
Orşelîmê hatibûn û hêza Xudan ji
bo başkirina nexweşiyan bi wî re
bû. 18 Û di wê demê de hin zila-
man mirovekî kûd, di nav livînên
wî de anîn û geriyan bona ku wî
bînin hundir û deynin ber Îsa.
19 Û gava wan ji ber ajawê rê
nedîtin ku wî bibin hundir, ew
hilkişiyan ser xanî û yê kûd di
nava kiremîtên xanî de tevî livînên
wî daxistin nav holê, cem Îsa.
20 Gava wî baweriya wan dît, ji
yê kûd re got: Ya zilamo; gunehên
te ji te re hatin bexşandin!
21 Û alimên zagonê û Fêrisiyan
dest pê kirin, fikirîn û gotin: Gelo
ev kî ye, yê ku kufr dike? Ma
xeynî Xwedê kî dikare gunehan
bibexşîne? 22 Îsa ji ber ku
dizanîbû ew çi difikirin, bersiv da
û ji wan re got: Ma hûn di dilên
xwe de çi difikirin? 23 Ma kîjan
hêsanîtir e: Gotina ku gunehên
te ji te re hatin bexşandin! an
gotina ku: Rabe û bimeşe?
24 Lê belê bona ku hûn bizanibin
rayedariya Lawê Mirov heye ku,
li rûyê erdê gunehan bibexşîne; ji
yê kûd re got: Ez ji te re dibêjim,
rabe, livînên xwe hilde û here
mala xwe! 25 Û yê kûd hema ji
pêş wan ve rabû ser xwe, rahişt
livînên xwe yê ku ew di nav
wan de bû, çû mala xwe û pesnê
Xwedê da. 26 Û hemû li xwe
heyirî man, pesnê Xwedê dan,
hundirê wan tijî tirs bû û gotin:
Îroj me tiştên ecêb dîtin!

*Îsa bangî Lêwî dike*

Met 9,9-13; Marq 2,13-17

27 Û piştî vê bûyerê Îsa ji wir der-
ket û bacgirekî navê wî Lêwî ye,
di bacxanê de rûniştî dît û ji wî re
got: Li pey min were! 28 Û wî ji
dev ji her tiştî berda, rabû ser xwe
û li pey wî çû. 29 Û Lêwî di mala
xwe de ji wî re ziyafetek mezin
çêkir; li sifrê, gellek bacgirt û ji
mirovên din bi wan re rûniştî, aja-
weyek mezin hebû. 30 Û Fêrisiyan
û alimên wan yên zagonê, bi ser
şagirtên wî de pitepit kirin û gotin:
Çima hûn bi bacgirt û gunehkaran
re dixwin û vedixwin? 31 Û Îsa

1 Di Cihûdan de firqeyek olê ye.

2 Alimên zagonê û nivîskar di yek manê de ne, tê maneya şerîetzan û mamosteyê zagonê.

bersiv da wan û got: Hewcedariya
tenduristiyan[1] ji hekîm re nîne, lê
hewcedariya nexweşan jê re heye.
32 Ez ne hatime ku bona tobeki-
rinê bangî qencan bikim, lê bona
bangkirina gunehkaran ez hatime.

*Pirsa li ser rojiyê*

Met 9,14-17; Marq 2,18-22

33 Lê belê wan ji Îsa re gotin:
Şagirtên Yehya pirr caran rojiyê
digirin û dua dikin û yên Fêrisi-
yan jî ûsa dikin, lê belê yên te di-
xwin û vedixwin. 34 Îsa ji wan re
got: Ma hûn dikarin heta ku zava
di nav wan de be, rojiyê bi civa-
ta dawetê[2] re bidin girtin? 35 Lê
belê dê rojên bên ku, zava ji nav
wan ve bê stendin û ew ê di wan
rojan de rojiyê bigirin.
36 Wî wekokekê jî ji wan re got:
Tu kes bona cilê kevin pîne bike,
perçekî ji cilekî nû jê nake; ji ber
ku dê him cilê nû bê çirandin û
him jî ew perçê ji yê nû hatiye
stendin bi cilê kevin re dê li hev
nê. 37 Û tu kes xemra nû naxe
meşka kevin; ji ber ku xemra nû
dê meşkê biçirîne, xemr birije û
meşk jî telef dibe. 38 Lê belê divê
xemra nû têxin meşka nû. 39 Û
tu kes piştî ku xemra kevin ve-
xwe, ya nû naxwaze; ji ber ku ew
dibêje: Ya kevin xweş e!

*Pirsgirêka Roja Şemiyê*

Met 12,1-8; Marq 2,23-28

6 Û wusa bû ku, rojekê Sebtê,
gava Îsa di nava zeviyên
geniman de diçû, şagirtên wî simi-
lên genim jê dikirin, di nav destên
xwe de difirikandin û dixwarin.
2 Lê belê hinekên ji Fêrisiyan ji
wan re gotin: Çima hûn vî tiştê ku
di roja Sebtê de qedexe ye, dikin?
3 Û Îsa bersiv da wan û got: Ma qey
gava ew û yên bi wî re ne birçîbûn,
Dawid çi kiriye we nexwendine?
4 Çawa ew kete mala Xwedê û nanê
pîroz girt, xwar û di ser de da yên
ku pê re ne[3]; ew nanên ku xwarina
wan xeynî kahînan, ji kesên din re
qedexe bûn ku bixwin? 5 Û wî ji
wan re got: Lawê Mirov Xudanê
roja Sebtê ye jî.

*Mirovê dest hişkbûyî*

Met 12,9-14; Marq 3,1-6

6 Û wusa bû ku, di roja Sebtek din
de ew ket kenîştê û dest bi hîn-
kirinê ve kir; li wê derê mirovek
destê wî yî rastê hişkbûyî hebû.
7 Çavên alimên zagonê û Fêri-
siyan li Îsa bûn, ka dê roja Sebtê
nexweşiyan baş bike an jî neke;
ji ber wan li tiştekî digeriyan ku
bi wê, wî sûcdar bikin. 8 Lê belê
Îsa bi ramanên wan dizanîbû û ji
zilamê destê wî hişkbûyî re got:

---

[1] Saxleman.
[2] An jî: Vexwendiyan ve.

*3* (1.Samûyêl 21:6)

Rabe ser pêlan û di navendê de bi-
sekine! Ew jî rabû ser pêlan û se-
kinî. 9 Îsa jî ji wan re got: Ez ji we
dipirsim: Divê ma di roja Sebtê de
qencî kirin, an jî xerabî kirin, caiz
e? Xelas kirina can, an jî helaq ki-
rin? 10 Û li çar hawirdora xwe, li
hemûyan nihêrt û ji yê desthişk re
got: Destê xwe dirêj bike! Zilam jî
destê xwe dirêj kir û destê wî bû
mîna berê. 11 Lê belê ew bi tûmî
şêt bûn[1] û ka hela dê bikaribin çi
bînin serê Îsa, bi hev re dişêwirîn.

*Hilbijartina donzdeh Şagirtan*

Met 10,1-4; Marq 3,13-19

12 Û wusa bû ku, Îsa di wan rojan
de bona ku dua bike, derket çiyê;
wî hemûya şevê bi duakirinê, ji
Xwedê re derbas kir. 13 Û gava bû
roj, bangî şagirtên xwe kir û donz-
deh kesî ji nav wan hilbijart; wî
navê Şandî da wan: 14 Şîmûn, yê
ku wî navê Pêtrûs jî lê kiribû û bi-
rayê wî Andrêyas, Aqûp û Yûhena,
Fîlîpûs û Bartolomeyo, 15 Meta û
Tûmas, Aqûpê lawê Alfay û Şîmûn
yê ku ji wî re digotin welatparêz jî,
16 Cihûdayê Lawê Aqûp û Cihû-
dayê Îsxeryotî, yê ku xaîn derket.

*Îsa nexweşan baş dike*

Met 4,23-25; Marq 3,7-12

17 Ew bi wan re daket jêr û li
cîhekî rast sekinî. Li wir, komekî
mezin ji şagirtên wî û ajaweyek
mezin ji gel ve hebûn. 18 Ew ji
seranserê Cihûstanê û ji Orşelîmê
û ji ber devê behrê û ji Sûr û
Sayda, bona wî guhdarî bikin û
ji nexweşiyên xwe qenc bibin
hatibûn. Û yên ku ji ruhên xerab
tengasî dikişandin jî, dihatin qenc
kirin. 19 Û hemûya gel ji bona ku
destê xwe li wî bixin dixebitîn,
ji ber ku ji wî hêz derdiket û
hemûyan qenc dikir.

*Dilxweşî û dilnexweşî*

Met 5,1-12

20 Û Îsa çavên xwe ji şagirtên
xwe re bilind kir û got: Xwezî li
we belengazan; ji ber ku Serwe-
riya Xwedê ya we ye! 21 Xwezî
li we, yên ku hûn niha birçî ne; ji
ber ku hûn ê bên têr kirin! Xwezî
li we, yên ku hûn niha digirîn; ji
ber ku hûn ê bikenin! 22 Xwezî li
we; gava di ber Lawê Mirov de,
mirov ji we bikerihin û we ji nav
xwe derxin û we biçûk bibînin û
navên we bi xerabî derxin! 23 Di
wê rojê de şa bin û ji kêfan loti-
kan bavêjin, ji ber ku li ezmanan
xelata we mezin e; ji ber ku bav û
kalên wan jî ûsa ji peyxamberan re
kirin. 24 Lê belê wey li we dewle-
mendan, ji ber ku we dilxweşiya
xwe stendine! 25 Wey li we, yên
ku hûn niha têr in, ji ber ku hûn
ê birçî bibin! Wey li we, yên ku
hûn niha dikenin, ji ber ku hûn

1 Har bûn.

ê bikevin şîn û giriyê! 26 Wey li
we, gava gel hemû bi qencî li ser
we biaxifin! Ji ber ku bav û kalên
wan jî, ji peyxamberên derewîn re
ûsa kiribûn.

*Ji neyarên xwe hez bikin*

Met 5,38-48

27 Lê belê ji we re, yên ku min
guhdarî dikin re dibêjim: Ji
neyarên xwe hez bikin; qenciyê
bi kesên ji we dikerihin re bikin!
28 Ji kesên nifiran li we dikin re
duayên qenc bikin û ji bo yên ku
heqaretê li we dikin, dua bikin!
29 Ji yê ku li lamê te bixe re, yê
din jî dirêj bike û ji yê ku ebayê te
bistîne re, kirasê xwe jî neparêze.
30 Bide heryekî ku ji te dixwaze
û tiştên xwe ji wî yê ku distîne, bi
şûn de nexwaze. 31 Û çawa hûn
dixwazin ku mirov ji we re bikin,
hûn jî ûsa ji wan re bikin!
32 Û ger hûn ji kesê ku ji we hez
dikin, hez bikin, gelo dê çi xelat
bi destê we keve? Ji ber gunehkar
jî kesên ku ji wan hez dikin, hez
dikin. 33 Û ger hûn qenciyê bi
kesê qenciyê ji we re dikin re
bikin, gelo dê çi xelat têkeve
destên we? Ji ber ku gunehkar
jî ûsa dikin. 34 Û ger hûn deyn
bidin kesên ku gûmana we tê de
heye ku dê deynê xwe bidin, dê çi
xelata we hebe? Gunehkar jî deyn
didin gunehkaran ku bona ya wan
dîsa li wan vegere.
35 Lê bele hûn ji neyarên xwe
ve hez bikin, qenciyê bikin, deyn
bidin û bi hêviya vegerandinê
nemînin; bi vî awayî dê xelata we
mezin be û hûn ê bibin lawê Yê
Bilind e; ji ber ku, ew ji nankoran
û xeraban re dayendeyê nîmetê
ye[1]. 36 Çawa Bavê we dilovan e,
hûn jî dilovan bin.

*Li ser darazkirinê*

Met 7,1-5

37 Û daraz nekin ku, hûn jî neyên
daraz kirin; sûcdariyê nekin ku, hûn
jî neyên sûcdarî kirin; bibexşînin,
dê ji we re jî bête bexşandin!
38 Bidin û dê ji we re jî bête dayîn;
bi pîvanek qenc û bihevdedayî û bi
hevdehejandî û bi ser ve çûyî, dê
bikeve dawa we. Ji ber ku hûn bi
çi pîvanê bipîvin, dê bi wê pîvanê,
ji we re bê pîvandin.
39 Îsa ev wekoka jî ji wan re
got: Ma yê kor dikare rêberiyê ji
yekî kor re bike? Ma dê herdu jî
nekevin kortikê? 40 Şagirt ne di
ser mamosteyê xwe re ye; lê belê
her yek, dê di hînbûna xwe de
bigihê, dê bibe mîna mamostayê
xwe. 41 Çima tu qirşika di çavê
birayê xwe de dibînî, lê belê mir-
diyaqê di çavê xwe de nabînî?
42 An jî, çawa tu dikarî ji birayê
xwe re bibêjî: Birayo, bihêle ku
ez vî qirşikê ji çavê te derxînim!

[1] An jî: Ji nankoran û xeraban re qencîkir e.

lê tu mirdiyaqê di çavê xwe de
nabînî? Hey mirovê durû! Ka
pêşiyê mirdiyaqa di çavê xwe
de derxe, tuyê hîn jî baş bibînî û
wê demê tuyê bikaribî qirşika di
çavê birayê xwe de derxinî.

*Dar û fêkiyê wê*

Met 7,16-20; 12,33-35

43 Ji ber ku dara qenc nîne ku, fê-
kiyê xerab bide û dîsa dara xerab
nîne ku, fêkiyê qenc bide. 44 Ji ber
ku her dar bi fêkiyê xwe tê nasîn;
ji ber ku mirov ji stiriyan hêjîran
nade hev û ne jî ji direhê tirî diçî-
ne. 45 Mirovê qenc ji xezîna dilê
xwe ya qenc, qenciyê derdixe û yê
xerab ji xezîna dilê xwe ya xerab,
xerabiyê derdixe, ji ber ku dev, yê
ji ser dil ve diherike dibêje.

*Kesê ku mala xwe bi zaniyarî ava dike*

Met 7,21-29

46 Çima hûn ji min re: Ya Xudan,
ya Xudan! dibêjin û tiştên ku ez
dibêjim nakin? 47 Ez ê rê we bi-
dim; ka kesê ku tê cem min, min
dibihîze û gotinên min tîne cîh,
mîna kî ye. 48 Ew mîna mirovekî
ye ku xaniyek ava kir; wî kola û
kûr kir û bingeha xênî li ser zinarê
ve danî. Gava av rabû, pêlên wê li
xênî dan, lê nikarîbûn xanî ji cîh ve
tev bidin, ji ber ku ew li ser zinarê
ve hatibû ava kirin. 49 Lê belê kesê
gotina min dibihîze û nake, mîna
mirovekî ku xaniyê xwe li ser axê
ve, bê bingeh ava kirî ye. Û gava
çem êrîşê kir, ew hema hilweşiya û
xerabûna wî xaniyî zehf mezin bû.

*Serpelê Kefernahûmê*

Met 8,5-13

7 Piştî ku hemû van gotinên
xwe yî ku gel wan guhdarî
dikirin, xelas kir, Îsa çû Kefer-
nahûmê. 2 Û xulamekî serpelekî,
yê ku jê re biqîmet e, di dereca
mirinê de, nexweş bû. 3 Gava ku
wî di derheqê Îsa de bihîst, ka-
lepîrên Cihûdan, bona ku were
û xizmetkarê wî xelas bike rica
bikin, ji wî re şand. 4 Gava ew
hatin cem Îsa, pirr li ber wî ge-
riyan û gotin: Ew hêja ye ku tu
vêya ji wî re bikî; 5 ji ber ku, ew
ji gelê me hez dike û wî bi xwe
keniştê ji me re ava kiriye. 6 Îsa
bi wan re çû. Gava hindik mabû
ku ew bigihêje xênî, yê serpel
hinek hevalên xwe şand pêşiya
wî ku, ew van gotinan ji wî re bi-
bêjin: Ya Xudan, zehmet neke; ji
ber min xwe hêja nedît ku tu werî
bin xaniyê min! 7 Ji ber vê yekê
min xwe hêja nedît ku ez bêm
cem te; lê belê tenê gotinekê bi-
bêje û xulamê min dê qenc bibe!
8 Ji ber ku ez bi xwe jî mirovekî
di bin serdestiyê de me û di bin
emrê min de jî leşker hene; ez ji
yekî re dibêjim: Biçe! ew diçe û
ji yê din re dibêjim: Were! ew tê

û ez ji xulamê xwe re dibêjim:
Vê bike! ew wê dike. 9 Dema Îsa
van tiştan bihîst, lê ecêb ma; ve-
geriya û ji civaka ku li pey wî di-
hatin re got: Ez ji we re dibêjim:
Min di Îsraêlê de jî baweriyakî
ewqas mezin nedît! 10 Gava yên
hatibûn şandin vegeriyan malê,
wan dîtin ku xulamê serpel qenc
bûye.

*Vejîna lawê jinebiyê*

11 Û wusa bû ku, piştî vêya Îsa
çû bajarê ku jê re Nayîn digotin;
şagirtên wî û ajaweyeke mezin bi
wî re diçûn. 12 Gava ew nêzîkî
dergehê bajêr bû, a vay, cenazeyek
ji bajêr derdixistin; lawê pîreka
jinebî ya tenê bi serê xwe ye miribû
û gellekên ji gelê bajêr bi wê re bûn.
13 Û gava Xudan dayikê dît, dilê
wî pê şewitî û ji wê re got: Megrî!
14 Û ew nêzîkî darbestê bû, destê
xwe tê da û yên ku wê hilgirtibûn,
sekinîn. Îsa got: Xorto! Ez ji te re
dibêjim, rabe ser xwe! 15 Û yê
mirî rabû, rûnişt û dest bi axaftinê
kir û Îsa wî da diya wî. 16 Tirs bi
hemûyan ve girt, wan bilindahî dida
Xwedê û digotin: Peyxamberekî
mezin di nav me de rabûye! Û:
Xwedê hate alîkariya gelê xwe!
17 Û ev gotina di derheqê Îsa de
li seransera Cihûstanê û hawirdora
wê belav bû.

*Îsa bersiva pirsa Yehya dide*

Met 11,2-19

18 Û şagirtên Yehya jî ji wî re,
li ser van tiştan hemûyan gotin.
19 Û Yehya ji nav şagirtên xwe
bangî duduyan kir; wan şand cem
Xudan ku ji wî bipirsin: Ma yê ku
dê bihata, tu yî, an divê em li hê-
viya yekî din bimînin? 20 Gava
ew zilaman hatin cem wî, wan ji
wî re gotin: Yehyayê vaftîzkar me
şand cem te ku em ji te bipirsin:
Ma yê ku dê bihata, tu yî, an divê
em li hêviya yekî din bimînin?
21 Di wê saetê de Îsa gellek ji
nexweşî, êş û ruhên xerab baş kir
û çavên gellek koran vekir. 22 Û
Îsa bersiv da û ji wan re got: He-
rin û we çi dîtine, çi bihîstine, ji
Yehya re bêjin: Kor dibînin, kûd
dimeşin, bi cizamî paqij dibin,
kerr dibihîzin, mirî radibin û ji
belengazan re Mizgînî[1] tê waz
dan. 23 Û Xwezî bi wî kesê ku, di
min de tilpekî nebe!
24 Gava şandiyên Yehya çûn,
wî dest pê kir û ji ajawê re li ser
Yehya got: Ma hûn derketin çolê
ku, hûn çi bibînin? Qamîşek li ber
bayê diheje? 25 An hûn derketin
çolê ku, hûn çi bibînin? Mirovekî
ku kincên nermîn li xwe kiriye?
A vay, yên bi kincên spehî û di
dewlemendiyê de dijîn, ew di
qesrên qiralan de ne! 26 An jî hûn
derketin ku, hûn çi bibînin? Ma
peyxamberekî? Belê, ez ji we re

[1] Agahiya qenc, Încîl.

dibêjim û ji peyxamberekî jî hîn
bêtir! 27 Ev ew e, yê ku di der-
heqê wî de hatiye nivîsandin: A
vay, ez nûçevanê xwe di pêşiya
rûyê te de dişînim; ew ê rêya te li
pêşiya te amade bike[1]. 28 Ez ji we
re dibêjim: Di nav yên ku ji jinan
bûyîne[2] de, kesekî ji Yehya me-
zintir qet nîne, lê belê dîsa di Ser-
weriya Xwedê de yê herî biçûk ji
Yehya mezintir e.
29 Û gava hemûya gel, heta bi
bacgiran jî ev yek bihîstin, wan
heqiya Xwedê nas kirin; ji ber
ku, bi vaftîz kirina Yehya ve
hatibûn vaftîz kirin. 30 Lê belê
heçî Fêrisî û alimên zagonê bûn,
daxwaziya Xwedê, ji bona xwe
qebûl nekirin, ji ber ku bi vaftîz
kirina wî ve nehatibûn vaftîz ki-
rin. 31 Û Xudan got: Ma ez mi-
rovê vî nifşî bi kê bişibînim û ew
mîna kê ne? 32 Ew wekî zarokên
ku li nav qada bajêr rûdinin û bi
vî awayî bangî hev dikin û: Me
bilûrê ji we re lêxistin, lê belê hûn
nereqisîn; me ji we re avêt ser
miriyan, lê belê hûn negiriyan,
dibêjin in! 33 Ji ber ku Yehyayê
vaftîzkar hat, ne nan dixwar û ne
jî xemrê vedixwar; we got: Di wî
de cin heye![3] 34 Lawê Mirov jî
hat, ew dixwe û vedixwe û hûn
dibêjin: Ev mirovekî pirrxwer û
xemrvexwar e, hevalê bacgir û
gunehkaran e! 35 Û zaniyarî ji
aliyê hemû zarokên xwe ve hate
tesdîq kirin.

*Li pîreka gunehkar ve borîn*

36 Yekî ji Fêrisiyan, Îsa bangî xwa-
rinê kir. Ew jî çû mala yê Fêrisî û
li sifrê rûnişt. 37 Û a vay, li bajêr
pîrekek gunehkar hebû û gava wê
bihîst ku ew li mala yê Fêrisî, li
sifrê rûniştiye, wê di firaxeke mer-
merê sipî de rûnekî bêhnxweş anî
38 û bi girî, li paşî Îsa hema li ber
lingên wî sekinî û bi hêsirên çavên
xwe lingên wî şil kir û paşê bi porên
xwe wan ziwa kir, ramûsand û rûn
li wan da. 39 Gava Fêrisiyê ku ew
bangî mala xwe kiribû, vana dît û
di ber xwe de ji xwe re got: Ger ev
mirov peyxamber bûya, dê bizanî-
ba ya destê xwe da wî, kî ye û çi
jin e; ji ber ku ew yeke gunehkar
e! 40 Û Îsa bersiv da û ji wî re got:
Şîmûn; gotinek min ji te re heye.
Wî jî got: Ka bibêje, Mamoste!
41 Du deyndarên deynxwazekî
hebûn; yek ji wan bi pênc sed û
yê din jî bi pêncî zîvî[4] deyndar
bû. 42 Ji ber bona ku deyndayînê
tiştekî wan tunebû, wî ji herdu-
yan re jî bexşand. Ji min re bêje:
Niha ji vana kîjan dê bêtir ji wî
hez bike? 43 Şîmûn bersiv da û

1 Maleyaxî 3:1
2 Welidîne.
3 An jî: Di wî de cinek heye!
4 Dînar.

got: Ez dibêjim, yê ku jê re bêtir
lê hate bexşandin. Wî jî ji wî re
got: Te rast got! 44 Û wî berê xwe
da pîrekê û ji Şîmûn re got: Tu vê
pîrekê dibînî? Ez hatim mala te, te
bona lingên min av neda min; lê
belê wê lingên min bi hêstiran şil
kir û bi porê xwe ziwa kir. 45 Te
ramûsanek neda min, lê belê wê, ji
dema ku ez ketime hundir ve, dev
ji ramûsandina lingên min berne-
daye. 46 Te rûnek di serê min de
neda, lê belê wê rûnekî bêhnxweş
di lingên min de da. 47 Ji ber vê
yekê ez ji te re dibêjim: Gunehên
wê yên pirr in, hatin bexşandin; ji
ber vê yekê wê pirr hez kiriye. Lê
belê yê ku jê re kêm tê bexşandin,
hindik hez dike. 48 Û wî ji wê re
got: Gunehên te hatin bexşandin!
49 Û yên ku bi wî re li sifrê
rûniştibûn, dest pê kirin û ji xwe
re gotin: Gelo ev kî ye ku, li gune-
han jî dibexşîne? 50 Îsa ji pîrekê
re got: Baweriya te, tu xelas kirî;
bi dilxweşiyê ve here!

*Jinên ku ji Îsa re xizmetê dikin*

8 Û wusa bû ku, piştî demekî
kurt Îsa dest bi gera bajar û
gundan û bi belavkirina Mizgîniya
di derheqê Serweriya Xwedê de
ye kir û her Donzdeh jî bi wî re
bûn. 2 Her wekî hinek jinên ku ji
ruhên xerab û nexweşiyan hatibûn
baş kirin, bi wan re bûn: Meryema
ku ji wê re digotin Mejdelanî, ya
ku heft cin ji wê derketibûn 3 û
Yohana jina Xûza yê keyayê
Hêrodês bû û Sosin û gellekên
din yên ku bi malê xwe alîkariya
wan dikirin.

*Wekoka Cotkar*

Met 13,3-9; Marq 4,3-9

4 Gava ajaweyeke mezin ji gel,
ji her bajarî li cem wî civiyan, wî
bi methelokê got: 5 Cotkar bona
tov çandinê derket û hîn wî tovê
xwe direşand, hinek ketin qeraxa
rê; di bin lingan de hate cûtin û
teyrên ezmanan wê xwarin. 6 Û
hinek jî ketin ser latê û şîn bûn,
lê zû hişk bûn, ji ber ku ew bê
rewa bû. 7 Û hinek jê ketin nava
stiriyan, stirî tevî wan mezin bûn
û wan xeniqandin. 8 Û hinek jê
ketin ser erdê qenc, şîn hatin û
berê wê sed tovî da. Gava ku wî
vana got qêriya: Yên guhê wan ji
bihîstinê re hebin, bila bibihîzin!

*Mana ku ji wekokê ve derdikeve*

Met 13,10-17; Marq 4,10-12

9 Şagirtên wî pirsa: Ka wateya
vê methelokê çi ye? ji wî pirsîn.
10 Wî jî got: Zanîna razên[1] di
derheqê Serweriya Xwedê de ji
we re hatiye dayîn; lê ji yên din
re, bi methelokan ve tê gotin; da
ku, ew binihêrin, lê nebînin û bi-
bihîzin, lê fêhm nekin.

[1] Sir.

*Mana wekoka Cotkar*

Met 13,18-23; Marq 4,14-20

11 Wateya metheloké jî ev e: Tov
gotina Xwedê ye. 12 Tovên ku
ketin ser rê, ew in ku, dibihîzin,
lê pişt re Îblîs tê û gotinê ji dilên
wan derdixe ku, bona ew bawe-
riyê neynin û xelas nebin. 13 Lê
heçî yên ser latê ne, ew kesên ku
gava dibihîzin, gotinê bi dilxweşî
qebûl dikin in; lê ew bê reh in; ba-
weriya wan heta bi demekê ye û di
çaxê ceribandinê de ew ji rê der-
dikevin. 14 Lê yên ku ketine nav
stiriyan jî, ew in ku, dibihîzin, lê
gava didin ser rê, bi xem û dewle-
mendî û kêfên vê dinê difetisin û
berên gîhayî nadin. 15 Lê heçî yên
di nava erdê qenc de ne, ew in ku,
gotinê dibihîzin, bi dilekî pak û
durist di dilê xwe de dihilînin û bi
sebir dexlê didin.

*Çira nayê veşartin*

Met 5,15-16; Marq 4,21-24; Lûq 11,33-36

16 Tu kes çirayekê vênaxe û bi
firaxekê venaşêre, an wê naxe bin
livîneké, lê belê li dijî vana, bona
yên werin hundir wê bibînin, wê
dixe şimadankekê[1]. 17 Ji ber ku
tiştekî veşartî nîne ku dê neyê
eşkerekirin û ne jî tiştekî veşartî
heye ku, nê naskirin û nekeve ber
ronahiyê. 18 Ji ber vê yekê, bala
xwe bidinê ku hûn çawa guhdarî
dikin, ji ber ku bi her kî re hebe,
dê jê re bête dayîn û bi her kî re
tunebe, dê tiştê ku gûman dike ku
bi wî re ye jî ji wî bête stendin.

*Dayik û birayên Îsa*

Met 12,46-50; Marq 3,31-35

19 Dayik û birayên Îsa hatin cem
wî û ji pirraniya ajawê nikarîbûn
ku xwe bigihînin wî. 20 Ji Îsa re
hate gotin ku: Dayik û birayên
te li derve sekinîne û dixwazin
te bibînin! 21 Lê belê Îsa bersiv
da wan û ji wan re got: Dayik û
birayên min, ew kesên ku gotina
Xwedê dibihîzin û dikin in[2]!

*Îsa bahozê disekinîne*

Met 8,23-27; Marq 4,35-41;
Zeb 107,23-31; 89,9

22 Û wusa bû ku, rojek ji rojan,
ew bi şagirtên xwe re li lotkekê si-
war bû û ji wan re got: Werin em
herin aliyê dinî golê û bi rê ketin.
23 Û gava ew bi lotkê ve diçûn,
ew bi xew ve çû û wê demê baho-
zek li golê rabû, av diket lotkê û
ew ketibûn xeterê. 24 Ew hatin
cem, wî hişyar kirin û gotin: Ma-
moste, Mamoste, em helaq dibin!
Îsa rabû û bi ba û pêlên avê ve pe-
kiya û ew sekinîn û bû bênderî[3].
25 Lê belê wî ji wan re got: Kanê

1 Şamdank, an jî: Mûmdank.
2 An jî: Tînin cîh in!
3 An jî: Bêdengî bû.

baweriya we? Ew di nav tirsê de,
ecêb man û ji hev û din re gotin:
Ma ev kî ye ku, him li ba, him jî
li avê emir dike û ew ji wî re îtaet
dikin?

*Îsa bi rayedariyê cinan diqewirîne*

Met 8,28-34; Marq 5,1-20

26 Û ew ber bi herêma Girasîni-
yan, ya ku diket pêşberê Celîlê
ve çûn. 27 Gava Îsa derket ser
reşayiyê, zilamek ji bajêr, pêrgî-
niyê li wî kir, di vî zilamî de cin
hebûn û ji zû ve kinc li xwe nedi-
kir û tu carî li malê nedima; lê li
nav goristanan dima. 28 Gava wî
Îsa dît, kir qêrîn û xwe li ber wî
avêt erdê û bi dengekî bilind got:
Ma tu çi ji min dixwazî, ya Îsa,
Lawê Xwedayê Bilind? Ez li ber
te digerim, min nede ezabê! 29 Ji
ber ku Îsa emir dabû ruhê xerab
ku, ji wî mirovî derkeve. Ji ber
ku ji zû ve bi wî girtibû; ew bi
qeyd û zincîran dihat girtin jî, lê
dîsa wî qeyd dişkand û cin wî da-
jot çolan. 30 Îsa ji wî pirsî û got:
Navê te çî ye? Wî got: Lejyon[1]!
Ji ber ku pirr cin ketibûn nava
wî. 31 Û cinan li ber Îsa geriyan,
ew emir nede ku, ew herin korta-
la bêbinî. 32 Li wir, li serê çiyê
keriyek mezin yê berazan li wê
derê diçêriya hebû; bona ku bike-
vin nav wan ew li ber wî geriyan.
Û wî jî destûrê da wan. 33 Cin ji
zilam ve derketin, ketin berazan,
kerî jî ji kendalê, bi golê ve hate
avêtin û xeniqî.
34 Çaxa gavanan dît ku çi qe-
wimîn, ew reviyan û vê xeberê
li nav bajêr û li gundan belav ki-
rin. 35 Vê demê gel derketin ku
ka bibînin çi çêbûye û hatin cem
Îsa û ew mirovê ku cin ji nava
wî derketibûn, bi kinc, hiş li serî
û li ber lingên Îsa rûniştî dîtin û
tirsiyan. 36 Yên vêya dîtibûn jî,
ji wan re gotin, çawa yê cinoyî
hate xelas kirin. 37 Û hemûya
gelê ji hawirdora Girasîniyê, li
ber Îsa geriyan ku ew ji nava
wan here, ji ber ku tirsekî mezin
ketibû dilê wan; ew jî kete lotkê
û şunde vegeriya. 38 Lê belê zi-
lamê ku cin ji wî derketibûn, li
ber Îsa geriya ku ew li cem wî
bisekine[2]. Lê belê Îsa ew bi rêkir
û ji wî re got: 39 Vegere mala
xwe û bibêje, ka Xwedê çi ji te
re kiriye! Û ew jî çû û li nava
hemûya bajêr bang kir ku, Îsa çi
ji wî re kiribû.

*Keçika Yaîros û pîreka ku donzdeh sal e xwîn jê diçe*

Met 9,18-26; Marq 5,21-43

40 Û gava Îsa şunde vegeriya,
gel pêşwaziyê ji wî re kirin; ji ber
ku hemû li benda wî bûn. 41 Û a

[1] Liqek leşkerî ya Romiyan, nêzîkî 6000 leşker e.

[2] An jî: Îsa wî bi xwe re bibe (bihêle).

vay, serokekê keniştê ku navê wî
Yaîros bû, hat; wî xwe avêt ber
lingên Îsa û li ber wî geriya ku,
ew bi wî re here mala wî. 42 Ji
ber ku keçikek wî bi tenê, temena
wê nêzîkî donzdeh salî hebû û li
ber mirinê bû. Îsa jî gava diçû wê
derê, ajaweyê wî di nav xwe de
dida ber palan[1].
43 Û pîrekek ku donzdeh sal e
xwîn jê diçû û hemûya rizqê xwe
dabû hekîman û tu kesekî wê
negihandibûn tenduristiya wê,
44 ji paş ve hat û destê xwe gihand
rêşiyên kirasê Îsa û hema xwîna
wê ji wê çikiya. 45 Û Îsa pirsa: Ew
kî bû ku destê xwe di min da? pirsî.
Lê belê gava her kesî înkar kirin,
Pêtrûs û yên ku bi wî re bûn gotin:
Mamoste, ajawe li te tê hev û te
dide ber palan[2] û tu dibêjî: Ew kî bû
ku destê xwe li min da? 46 Lê belê
Îsa got: Mirovekî destê xwe di min
da, ji ber ku ez pê hesiyam ku, hêz
ji min derket. 47 Pîrek jî, dema dît
ku ew veşartî nema, bi lerizandinê
ve hat, xwe li ber wî avêt erdê û
li ber hemûya gel, ka wê ji ber çi
destê xwe di wî de dabû û çawa di
cîh de şîfê dîtiye, got. 48 Îsa ji wê
re got: Baweriya te, tu qenc kirî; bi
dilxweşiyê here!
49 Hîn Îsa diaxifî, yek ji mala
serokê keniştê hat û got: Keça
te mir, êdî Mamoste newestîne!
50 Lê belê gava Îsa ev bihîst,
bersiv da wî û got: Metirse, tenê
bawer bike û dê keçik baş bibe!
51 Gava ew hat mala zilam, nehişt
xeynî Pêtrûs û Yûhena û Aqûp û
dayik û bavê keçikê kes derbasî
hundir bibin. 52 Her kes digiriyan
û bona keçikê şînê dikişandin; lê
belê Îsa ji wan re got: Megirîn,
ew ne mirî ye, lê di xewê de ye.
53 Û ew bi wî keniyan, ji ber wan
zanîbûn ku ew mirî bû. 54 Lê belê
Îsa bi destê wê girt û bang kir û
got: Rabe ser pêlan, ya keçikê!
55 Û dema ruhê keçikê li wê
vegeriya, ew di cîh de rabû
ser xwe; Îsa emir da ku tiştekî
xwarinê bidin keçikê. 56 Û dayik
û bavê keçikê heyirî man; lê Îsa
emir da wan ku, vê bûyerê ji
kesekî re nebêjin.

*Şandina donzdeh Şagirtan*

Met 10,1-16; Marq 6,7-13

9
Îsa bangî her Donzdehan kir,
hêz û rayedariyê li ser hemû ci-
nan û ji bo qenckirina nexweşiyan
da wan 2 û wan şand ku ew Ser-
weriya Xwedê bidin naskirin û
nexweşan baş bikin. 3 Û wî ji wan
re got: Tiştekî ji bona rê bi xwe re
nebin, ne dar, ne tûr, ne nan, ne
pere û bila ne jî du kirasê we he-
bin. 4 Û xaniyê ku hûn bikevinê, li
wir bimînin û ji wir bidin rê. 5 Û

1 [illegible] tengavkirin
2 An jî: Ajawe te dide ber palan û tan dide

li her derê ku ew we qebûl nekin,
ji wî bajarî derkevin û bona ku li
dijî wan bibe şahdeyî toza lingên
xwe biweşînin. 6 Ew jî derketin
rê û gund bi gund derbas dibûn;
Mizgîniyê didan û li her derê
nexweşan baş dikirin.

*Pirsa Hêrodês*

Met 14,1-2; Marq 6,14-16

7 Hêrodêsê rêvebiriyê ji çaran
pariyekî welat dikir, hemû tiştên
bûyîne bihîst; ji ber ku hinan
digotin: Yehya ji nav miriyan
rabûye zehf ecêb ma. 8 Hin kesên
din jî digotin: Êlyas xuya bûye û
hinan jî digotin: Yek ji peyxam-
berên berê, ji nû ve rabûye. 9 Lê
Hêrodês got: Min serê Yehya da
jêkirinê; lê belê gelo ev zilamê ku
min ewqas tişt di derheqê wî de
bihîstiye kî ye? Û dixwest ku wî
bibîne.

*Îsa pênc hezar kesî têr dike*

Met 14,13-21; Marq 6,30-44;Yû 6,1-14

10 Û gava şandî vegeriyan, her
tiştên ku kirine, ji Îsa re gotin. Û
wî wan girt cem xwe û çû cîhekî
tenha li aliyê bajarê ku navê wê
Beytsayda ye. 11 Lê belê gava gel
vêya bihîstin, li pey wî çûn; wî
wan qebûl kirin û ji wan re, li ser
Serweriya Xwedê axifî û wî, yên
hewcedariya wan ji baş kirinê ve
hebûn, baş dikirin. 12 Dema roj li
ber ava bû, her Donzdeh hatin û ji
wî re gotin: Gel berde ku, bila ew
herin gundên hawirdor û nav malan
ku, cîhê razan û xwarinê ji xwe re
bibînin, ji ber ku em li vê derê, li
cîhekî tenha ne! 13 Lê belê Îsa ji
wan re got: Hûn xwarinê bidin
wan! Wan jî gotin: Ji pênc nan û
du masiyan pê ve tiştekî me tuneyî;
an jî ma divê em herin û ji hemûya
vî gelî re xwarinê bikirin? 14 Ji ber
ku nêzîkî pênc hezar mêr bûn. Lê
belê Îsa ji şagirtên xwe re got: Wan
nêzîkî pêncî kesî kom bi kom bikin
û li cem hev deynin rûniştinê!
15 Û wan ûsa kirin û hemûyan li
cem hev danîn rûniştinê. 16 Îsa
rahişt her pênc nan û herdu masiyan,
çavên xwe ber bi ezmanan ve rakir,
şikir kir û wan şikand û da şagirtên
xwe ku, wan deynin ber civakê.
17 Û her kes bi têrayî xwar û
donzdeh selikên nanên hûrbûyî ji
ber wan mabûn, dan hev.

*Şahdeyiya ku Pêtrûs di derheqê Îsa de kir*

Met 16,13-21; Marq 8,27-31

18 Û wusa bû ku, dema Îsa bi
tenê dua dikir, şagirtên wî li cem
wî bûn û wî ji wan pirsî û got: Li
gor gotina gel ez kî me? 19 Wan
bersiv dan û gotin: Hin dibêjin:
Yehyayê vaftîzkar, hin Êlyas û
hinekên din jî dibêjin ku, yek ji
peyxamberên berê rabûye. 20 Wî
ji wan re got: Lê hûn dibêjin ku
ez kî me? Pêtrûs bersiv da û got:

Tu Mesîhê Xwedê yî! 21 Lê belê
wî temmî li wan kir û emir da
wan ku, ew vê yekê ji kesekî re
nebêjin. 22 Û wî got: Divê Lawê
Mirov gellek cefayê bikişîne û
ji kalepîran û serokên kahînan û
alimên zagonê ve were red kirin û
kuştin û roja sêwemîn biveje.

*Rahêje xaça xwe û li pey min were*

Met 16,24-28; Marq 8,34-9,1

23 Û wî ji hemûyan re got: Yê
ku bixwaze li pey min were, bila
ew xwe înkar bike, her roj rahêje
xaça xwe û li pey min were. 24 Ji
ber ku yê bixwaze jiyana xwe xe-
las bike, ew ê wê winda bike, lê
belê yê jiyana xwe di ber min de
winda bike, ew ê wê xelas bike.
25 Ma çi feyda mirovekî heye,
ger ku hemûya dinê bi dest bixe,
lê belê jiyana xwe winda bike, an
ziyaneke bigihîne xwe? 26 Ji ber
ku kî ji ber min û gotinên min ji
xwe fihêt bike, dê Lawê Mirov jî
ji ber wî ji xwe fihêt bike, gava ew
bi rûmeta xwe û ya Bavê xwe û ya
milyaketên pîroz ve were. 27 Lê
belê ez ji we re bi rastî dibêjim:
Di nav yên li vir sekinîne de hinek
hene ku, heta ku Serweriya Xwe-
dê nebînin, mirinê tahm nakin.

*Xuyabûna Îsa tê guhertin*

Met 17,1-9; Marq 9,2-9

28 Û wusa bû ku, paşî van gotin-
an nêzîkî heyşt rojî, wî, Pêtrûs û
Yûhena û Aqûp bi xwe re girt û
hilkişiya ser çiyê ku dua bike.
29 Û gava wî dua dikir, xuyabûna
wecê wî hat guhertin, kincên wî
sipî bûn û şewq dan. 30 Û a vay,
du kes bi wî re diaxifîn; ew Mûsa
û Êlyas bûn. 31 Ew di nav rûmetê
de xuya bûbûn û li ser mirina wî,
ya ku dê li Orşelîmê, biçûya serî
diaxifîn. 32 Lê belê Pêtrûs û yên
bi wî re, bi xewa giran ketibûn;
paşî ew qenc hişyar bûn, wan rû-
meta Îsa û herdu zilamên bi wî re
sekinî dîtin. 33 Û gava ew ji cem
Îsa cihê dibûn, Pêtrûs ji Îsa re got:
Mamoste, qenc e ku em li vir in!
Em ê sê çardaxan çêbikin; yek ji
te re û yek ji Mûsa re û yek jî ji
Êlyas re! Lê belê wî nizanîbû ku,
ew çi dibêje. 34 Hîn Pêtrûs vana
diaxifî, ewrek hat û siya xwe li
ser wan veda; gava ew ketin nav
ewrê, tirsiyan. 35 Û dengek ji ewr
ve hat û got: Lawê minî xoşewîst
ev e, wî guhdarî bikin! 36 Û gava
deng hat, Îsa tenê hat dîtin. Û ew
hiş bûn û tiştek ji dîtinên xwe, di
wan rojan de ji kesekî re negotin.

*Îsa lawikekî cinoyî baş dike*

Met 17,14-21; Marq 9,14-29

37 Û wusa bû ku, roja din, dema
ew ji çiyê daketin, ajaweyeke
mezin li pêşwaziya wî derketin.
38 Û a vay, zilamekî ji nava
ajawê, bi dengekî bilind bang kir
û got: Ya Mamoste, ez li ber te di-

gerim, bi çavê dilovaniyê li lawê
min binihêre; ji ber ku ew yê minî
bi tenê ye! 39 Û a vay, ruhek bi wî
digire û ew nişka ve diqêre û ruh,
heta ku kef bi ser bikeve wî ji hev
vedihejîne û bi tundî wî dieciqîne
û bizorê ji wî diqete. 40 Û ez li
ber şagirtên te geriyam ku, ew cin
derxînin, lê belê wan nikarîbûn.
41 Wê demê Îsa bersiv da û got:
Hey nifşa bêbawerî û ji rê ve der-
ketî; ma ez ê heta kengê bi we re
bim û li we sebir bikim? Ka lawê
xwe bîne vir! 42 Û hîn ew di rê
de dihat, cin wî avêt erdê û ji hev
hejand. Lê belê Îsa ruhê xerab
azirand, lawik baş kir û wî dîsa da
bavê wî. 43 Û li ber mezinahiya
Xwedê, hemû ecêb man.

*Îsa cara duwemîn li ser mirin û vejîna xwe dibêje*

Met 17,22-23; Marq 9,30-32

Gava hîn hemû bi kirinên Îsa ecêb
diman, wî ji şagirtên xwe re got:
44 Van gotinan bixin guhên xwe!
Ji ber ku dê Lawê Mirov, bidin
destê mirovan! 45 Lê belê wan
vê gotinê fêhm nekirin û bona
ku fêhm nekin, ji wan ve hatibû
veşartin û ew ditirsiyan ku, di der-
heqê vê gotinê de jê bipirsin.

*Yê herî mezin kî ye?*

Met 18,1-6; Marq 9,33-42

46 Û guftegoyek ket nav wan, ka
di nav wan de yê herî mezintir
kî ye? 47 Îsa jî bi zanîna fikrên
dilê wan, zarokekê biçûk anî û
li kêleka xwe danî. 48 Û ji wan
re got: Ew kesê ku vî zarokî bi
navê min qebûl bike, ew min qe-
bûl dike û ew kesê ku min qebûl
dike, ew yê ku min şandiye qe-
bûl dike. Ji ber ku kî di nav we
hemûyan de yê herî biçûk e, ew
yê mezin e!
49 Yûhena bersivê da û got: Ma-
moste, em li rastî miroveki ha-
tin, cin bi navê te derdixist û me
nehişt; ji ber ku ew bi me re, li
pey te nayê. 50 Û Îsa ji wî re got:
Ji wî re nebin astengî! Ji ber yê ku
ne li dijî we be, ew bi we re ye.

*Samîriyan Îsa qebûl nakin*

51 Û wusa bû ku, gava rojên
hilkişandina wî nêzîk dibûn, wî
berê xwe da Orşelîmê ku, here
wê derê 52 û wî qasidan di pêşiya
xwe de şand. Û ew çûn gundekî
Samîriyan ku amadeyiyê jê re
bikin. 53 Lê belê wan Îsa qebûl
nekirin, ji ber ku wî berê xwe
dabû Orşelîmê. 54 Gava şagirtên
wî, Aqûp û Yûhena vêya dîtin,
gotin: Ya Xudan, gelo tu dixwa-
zî, mîna ku Êlyas jî kiribû, bona
ku, agir ji ezmanan bibare û wan
helaq bike, em emir bidin? 55 Lê
belê Îsa zivirî û dengê xwe li wan
hilda û got: Ma qey hûn nizanin,
hûn zarokên kîjan Ruhî ne? 56 Û
pişt re ew çûn gundekî din.

*Pêşîhatina banga ezmanî*

Met 8,19-22

57 Û gava ew bi rê ve diçûn, yekî ji Îsa re got: Ez ê li pey te werim, her derê ku tu herê! 58 Û Îsa ji wî re got: Kunên rêviyan û hêlînên teyrikên ezmanan hene, lê belê ji Lawê Mirov re cîhekî nîne ku ew serê xwe lê deyne. 59 Û wî ji yekî din re: Li pey min were! got. Lê belê wî got: Pêşiyê destûrê bide min ku, ez herim bavê xwe binax bikim! 60 Û Îsa ji wî re got: Bila mirî miriyên xwe veşêrin; lê belê tu here û Serweriya Xwedê bide bihîstin! 61 Yekî din jî got: Ya Xudan, ez ê li pey te werim, lê belê pêşiyê destûrê bide min ku, ez xatirê xwe ji maliyên xwe bixwazim! 62 Lê belê Îsa ji wî re got: Kesê ku destê xwe deyne ser hevcar û li paş ve binihêre, ne hêjayî Serweriya Xwedê ye!

*Îsa heftê Şagirtên xwe dişîne*

Met 9,37

10 Piştî vê yekê, Xudan heftê şagirtên din jî hilbijart û wan du kes du kes, di pêşiya xwe de şand, her bajar û cîhê ku wî dixwest, ew bi xwe biçûya yê. 2 Û wî ji wan re got: Dexl zêde ye[1], lê belê pale hindik in. Ji ber vê yekê, li ber xwediyê dexlê ve bigerin ku, ew paleyan bişîne nav dexla xwe! 3 De herin! A vay, ez we mîna berxan dişînim nav guran. 4 Ne kîsik, ne tûr, ne jî çaroxan bi xwe re bibin û di rê de silavê nedin tu kesî. 5 Hûn têkevin kîjan malê, pêşiyê bibêjin: Bila dilxweşî li ser vê malê be! 6 Û ger mirovek hêjayî dilxweşiyê li wir hebe, dilxweşiya we, dê li ser wî bimîne; lê belê ger tune be, dê ew dîsa li we vegere. 7 Û di wê malê de bimînin, tiştên ku datînin li ber we, bixwin û vexwin, ji ber ku yê pale hêjayî heqê xwe ye. Ji malekê neçin ya din. 8 Û dema hûn çûn bajarekî û ger we qebûl bikin, tiştên ku datînin li ber we, wê bixwin. 9 Nexweşên tê de baş bikin û ji wan re bêjin: Serweriya Xwedê nêzîkî we bûye! 10 Lê belê li kîjan bajarê hûn bikevinê û ew we qebûl nekin, derkevin qadên wê û bibêjin: 11 Em wê toza ku ji bajarê we bi lingê me ve maye jî, li dijî we dadiweşînin, lê belê bizanin ku, Serweriya Xwedê nêzîkî we bûye! 12 Ez ji we re dibêjim ku: Wê rojê, dê rewşa Sodomê ji rewşa wî bajarî çêtir be.

*Bajarên bêbawerî*

Met 11,20-24

13 Wey li te, ya Xorazîn! Wey li te, ya Beytsayda! Ger ev karên xurtî di nav we de hatin kirin, di Sûr û Saydayê de bihatibûna

1 Zehf e, pirr e, an jî: Mezin e.

kirin, wanê ji zû ve cilik[1] li xwe
pêçayî û di xweliyê de rûniştî
tobe bikirana. 14 Lê belê di roja
daraziyê de dê rewşa Sûr û Say-
dayê ji yê we çêtir be. 15 Û tu, ya
Kefernahûm, ma tuyê heta ezma-
nan bilind bibî? Tuyê heta warê
miriyan bête daxistin! 16 Yê ku
guh dide we, ew guh dide min û
yê ku we red dike, ew min red
dike û yê min red dike, ew yê ku
ez şandime, red dike.

*Heftê Şagirt bi kêfxweşî vedigerin*

Met 11,25-27; 13,16-17

17 Her heftê bi şahî vegeriyan û
gotin: Ya Xudan, cin jî bi navê
te, ji me re îtaet dikin! 18 Îsa bi vî
awayî bersivê da wan: Min dît ku,
çawa Îblîs wek birûskê ji ezmanan
ket. 19 A vay, min rayedarî daye
we ku, hûn pêlî mar û dûpişkan û
hemû quweta neyaran bikin û dê
tu tişt xesarê[2] nede we. 20 Lê belê
bi wê şa nebin ku, ruh ji we re îtaet
dikin, lê bi wê şa bin ku, navên we
li ezmanan hatine nivîsandin.
21 Di wê demê de Îsa bi Ruh
ve kêfxweş bû û got: Ya Bav,
Xudanê erd û ezman, ez ji te re
şikir dikim ku te van tiştana ji
yên bihîkmet û zanyaran veşart û
ew ji zarokên biçûk re eşkere kir.
Belê, Bavo, ji ber ku ev yek li te
xweş hat. 22 Her tişt ji Bavê min,
ji min re hatiye dayîn. Û kesek
nizane Law kî ye, xeynî Bav û
kesek nizane Bav kî ye, xeynî
Law û yê ku Law bixwaze bi wî
bide eşkere kirin.
23 Û wî berê xwe bi taybetî da
şagirtan û got: Xwezî bi wan ça-
vên ku wan tiştan dibînin, yên ku
hûn dibînin!.24 Ji ber, ez ji we re
dibêjim ku, gellek peyxamberan
û qiralan xwestin van tiştên ku
hûn dibînin, bibînin, lê belê wan
ew nedîtin û wan tiştên ku hûn
dibihîzin, bibihîzin, lê belê wan
nebihîstin.

*Wekoka Samîriyêyî yê qenc*

25 Û a vay, alimekî zagonê rabû,
Îsa ceriband û got: Ya Mamoste,
ma ez karim çi bikim ku, ez bibim
mêraskerê jiyana abadîn? 26 Û Îsa
lê vegerand û got: Ma di zagonê
de çi nivîsiye? Tu çawa dixwînî?
27 Wî jî bersiv da û got: Tuyê ji
Xudan, Xwedayê xwe bi hemû
dilê xwe û bi hemû canê xwe û bi
hemû hêza xwe û bi hemû aqilê
xwe hez bike û ji cînarê xwe jî
mîna xwe hez bike[3]! 28 Îsa ji wî re
got: Te rast bersiv da; tu vêya bike,
tuyê bijî! 29 Lê belê wî xwest xwe
rast derxe û ji Îsa re got: Ma cîranê
min kî ye?

[1] Yanê çûl.
[2] Ziyan, zirar, zerar.
[3] (5.Mûsa 6:5; 3.Mûsa 19:18)

30 Îsa lê vegerand û got: Zilamek ji
Orşelîmê daket xwar û çû Êrîhayê;
ew kete nav destê rêbiran û wan wî
tazî kirin, lêxistin û bi nîvkuştiyî
dev ji wî berdan û çûn. 31 Rastha-
tinek bû ku, kahînek ji wir derbas
bû; gava wî zilam dît, ji aliyê din
re derbas bû û çû. 32 Bi vî awayî,
gava yekî Lêwiyî jî hat wê derê, wî
zilam dît, ji aliyê din re derbas bû
û çû. 33 Lê belê gava yekî Samîri-
yeyî di wê rêya de derbas dibû, hat
cîhê ku ew lêbû û gava wî zilam
dît, dilê wî pê şewitî 34 û ew çû
cem wî; zeyt û xemrê di birînê wî
de da û wan girêda; zilam li de-
warê xwe siwar kir, bir mêvanxa-
neyekê û li wî xwedî derket. 35 Û
roja din du zîv derxist da xwediyê
mêvanxaneyê û ji wî re got: Li vî
mirovî xwedî derkeve! Û heqê her
tiştên ku te bêtir li wî serf kir, gava
vegerim, ez ê bidim te. 36 Bi te,
ma ji van hersiyan, kî bû cîranê yê
ku ketibû destê rêbiran? 37 Û wî
got: Yê ku dilê wî pê şewitî! Îsa
got: Tu jî here û wusa bike!

*Di mala Marta û Meryemê de*

Yêr 15,16; Met 6,33

38 Gava wan rêya xwe didoman-
din, Îsa kete gundekê. Pîrekek bi
navê Marta, wî qebûlî mala xwe
kir[1]. 39 Xwuşkeke wê bi navê
Meryemê hebû, Meryem li ber
lingên Îsa rûniştibû û guhên xwe
dida gotinên wî. 40 Lê çi heye ku
Marta bi gellek karî ve di teşqelê
de bû; ew hat cem Îsa û got: Ya
Xudan, ma hayê te jê tune ku
xwuşka min ez di xizmetê de tenê
hiştime? Ji wê re bibêje, bila alî-
kariya min bike! 41 Lê belê Îsa
bersiv da û got: Marta, Marta! Tu
xema gellek tiştan dixwî û bi wan
teşqelê dikî; 42 lê belê tenê hewca
tiştekî heye û Meryemê para qenc
ji xwe re bijartiye, ya ku dê ji wê
neyê stendin!

*Duaya çalak*

Met 6,9-13; 7,7-11

11 Û wusa bû ku, Îsa li cîhekî
dua dikir û dema ku qe-
dand, yekî ji şagirtên wî, jê re got:
Ya Xudan, ka me hînî duakirinê
bike, çawa ku Yehya şagirtên xwe
hîn kirine! 2 Îsa ji wan re got:
Çaxa hûn dua bikin, bibêjin: Ya
Bavo, bila navê te bê pîroz kirin!
Bila Serweriya te were! Mîna li
ezmanan, bila li erdê jî xwestina
te bê cîh! 3 Nanê me yî rojane, roj
bi roj bide me! 4 Û gunehên me
ji me re bibexşîne; ji ber ku em
jî ji her kesê ku deyndarê me ye
re dibexşînin! Û me nebe ceriban-
dinê, lê belê me ji yê xerab xelas
bike!
5 Û wî ji wan re got: Ji we he-
valekî kîjanî hebe ku, nîvê şevê
here cem wî û ji wî re bibêje: He-

---

1 Wî li mala xwe kir mêvan.

valo, ka sê nanî bi deyn bide min;
6 ji ber ku hevalê min ji rêwitiyê
ve hatiye cem min û tiştekî min
nîne ku ez deynim ber wî! 7 Û
ew jî ji hundir lê vegerîne û bêje:
Min bêaram meke! Êdî derî gir-
tiye û zarokên min li cem min,
di nav livînan de ne; ez nikarim
rabim û bidim te! 8 Ez ji we re
dibêjim, ger ew ji bona heval-
bendiyê ranebe û nede wî jî ew ê
ji ber bêrûtiya wî rabe û çiqas ji
wî re hewce bike, dê bide wî. 9 Û
ez jî ji we re dibêjim: Bixwazin
û dê ji we re bê dayîn, bigerin û
hûn ê bibînin, li derî bixin û ew ê
ji we re vebe! 10 Ji ber ku yê di-
xwaze, distîne û yê digere, dibî-
ne û yê li derî dixe, jê re vedibe.
11 Û di nav we de kîjan bav heye
ku, ger lawê wî nan bixwaze û
ew ê jî kevir bide wî? An jî ger
masî bixwaze, ew ê jî li dêvla
masî marê bide wî? 12 An jî ew
hêkekê bixwaze û ew ji dêvla wê
dûpişkekî bide wî? 13 Niha ger
hûn, yên xerab in jî, hûn zanin
tiştên qenc bidin zarokên xwe,
ma Bavê ezmanî hîn çiqas bêtir
dê Ruhê Pîroz bide yên ku ji wî
dixwazin!

*Bi Ruhê Pîroz qewirandina cinan*

Met 9,32-34; 12,22-30; Marq 3,22-27

14 Û Îsa cinekî lal derdixist. Û
wusa bû ku, gava cin derket, yê
lal axifî û gel ecêb ma. 15 Lê belê
hinekan ji wan gotin: Ew bi se-
rokê cinan Beelzebûl, cinan derdi-
xe! 16 Û hinekan jî Îsa ceriband
û nîşanek ji ezmanan jê xwestin.
17 Lê belê Îsa bi fikrên dilê wan
zanî û ji wan re got: Her serweriya
ku li dijî hev dubendiyê bike, xera
dibe û mala ku yekîtiya wê nebe,
dikeve. 18 Ger Îblîs jî li dijî xwe
bi xwe rabe, dê serweriya wî çawa
bimîne? Ji ber ku hûn dibêjin ku
ez bi Beelzebûl cinan derdixim.
19 Ger ez bi Beelzebûl cinan der-
dixim, wê demê ma lawên we bi
kî derdixin? Ji ber vê yekê, ew ê
bibin darazkirên we. 20 Lê belê
ger ez bi tiliya Xwedê cinan der-
dixim, wê demê dibe Serweriya
Xwedê gihaştiye we! 21 Dema
yekî çekdar û biquwet qesra xwe
diparêze, tiştên wî di dilxweşiyê
de dimînin. 22 Lê belê gava yekî
ji wî biquwettir were û wî bindest
bike, dê ew hemû çekên wî yên
ku ew bi wan ewle dibû bistîne û
talana wî par bike. 23 Yê ku ne bi
min re ye, li dijî min e û yê ku bi
min re necivîne, belav dike!

*Gava ku ruhê xerab vedigere*

Met 12,43-45

24 Dema ruhê xerab ji mirov der-
dikeve, bona aramiyê bibîne, di
cîhên bê av de digere. Û gava li
tiştê ku lê digere, nabîne, dibêje:
Ez ê vegerim mala xwe ya ku ez
ji wê derketime. 25 Û gava tê,

dibîne ku ew paqijkirî û hatiye
xemilandin. 26 Wê demê ew diçe
û heft ruhên din yên ji xwe xerab-
tir tîne û ew dikevin wir û rûdinin
û rewşa wî mirovî yê dawî, ji yê
pêşî xerabtir dibe.

*Dilxweşiya rasteqîn*

27 Û wusa bû ku, dema Îsa ev
tiştan digot, pîrekek ji nava ajawê
dengê xwe bilind kir û ji wî re got:
Xwezî bi rehma ku te kişandiye û
pêsîrên ku te mêtandine! 28 Lê
belê Îsa got: Belê, lê hîn bêtir
xwezî bi wan, yên ku gotina Xwe-
dê dibihîzin û wê tînin cîh!

*Bersiva kesên ku nîşanan dixwazin*
Met 12,38-42

29 Û dema gel li dora wî diciviyan,
Îsa dest bi gotinê kir: Ev nifşê han,
nifşekî xerab e! Nîşanekê dixwaze
û ji nîşana Yûnis peyxamber pê
ve nîşaneke din ji wan re nayê
dayîn. 30 Ji ber, çawa ku Yûnis
ji gelê Neynowê re bûye nîşan,
Lawê Mirov jî dê ji vî nifşî re ûsa
bibe. 31 Qiralîçeya Başûr[1], di roja
daraziyê de dê bi zilamên vî nifşî
re rabe û dê wan sûcdar bike; ji
ber ku ew ji dawiyên dinyayê hat
ku, guh bide zanyariya Silêman
û a vay, yekî ji Silêman hîn jî
mezintir li vir e! 32 Zilamên
Neynowê di roja daraziyê de dê
bi vî nifşî re rabin û wan sûcdar
bikin, ji ber ku wan bi waza Yûnis
tobe kirin û a vay, yekî ji Yûnis
hîn jî mezintir, li vir e!

*Ronahiya Ruhanî*
Met 5,15; 6,22-23; Marq 4,21-23;
Lûq 8,16-18

33 Tu kes çirayê vênaxe û danî-
ne cîhekî veşartî, an jî naxe bin
çapê, lê belê wê dixe şimadankê
ku, yên dikevin hundir, ronahiyê
bibînin. 34 Roniya bedenê çavê te
ye; ger çavê te qenc be, hemû be-
dena te jî dibe ronahî, lê belê ger
çavê te xerab be, bedena te jî dibe
tarî. 35 Bi vî awayî bala xwe bide
ku, ronahiya di te de, nebe tarî!
36 Ger hemûya bedena te ronahî
be û tu derê tarî tê de tune be, ew
dibe wek ku çira bi şewqa xwe te
ronahî dike, ûsa hemû ronî dibe.

*Îsa li dijî Fêrisî û Alimên olê diaxife*
Met 23,1-36; Marq 12,38-42

37 Dema Îsa diaxifî, yekî Fêrisî
rica ji wî kir ku, li cem wî xwarinê
bixwe; ew jî çû û li sifrê rûnişt.
38 Lê belê gava yê Fêrisî dît ku, ji
berî xwarinê, wî destê xwe li gor
adeta wan neşuşt, ecêb ma. 39 Xu-
dan jî ji wî re got: Hûn Fêrisî der-
veyê qedeh û sêniyan paqij dikin,
lê belê hundirê we tijî şelandinî û
xerabî ye. 40 Hey bêaqilno! Ma
yê derve çêkirî hundir jî çêneki-
riye? 41 Lê belê ya qenc ew e ku,

---
1 Qiralîça Şebayê, ya ku hatibû serîdanka Silêman.

hûn ji tiştên xwe yên heyî xêran
bidin, wê gavê dê her tişt ji we re
paqij bibe! 42 Lê belê wey li we
Fêrisiyan! Ji ber ku hûn deheka
pûng, catir û hemû cureyên pin-
carê didin, lê belê hûn dev ji rastî
û hezkirina Xwedê berdidin! Divê
we ev bikirana û dev ji yên din jî
bernedana. 43 Wey li we Fêrisi-
yan! Ji ber ku hûn di keniştan de ji
kursiyê pêşî û di sûkan de ji silav
stendinê hez dikin! 44 Wey li we!
Ji ber ku hûn wek wan tirbên ne-
nas in, yên ku mirovên li ser wan
digerin, bi wan nizanin!
45 Û yekî ji alimên zagonê, bersiv
da û ji Îsa re got: Ya Mamoste, bi
van gotinan tu me jî xerab derdixî!
46 Lê belê Îsa got: Wey li we jî,
ya alimên zagonê! Ji ber ku hûn
barên hilgirtina wan bi zehmet e,
didin pişta mirovan û hûn bi xwe
tiliyekî xwe jî nadin wan baran.
47 Wey li we! Hûn tirbên pey-
xamberên ku bi destê bav û kalên
we hatine kuştin çêdikin. 48 Bi vî
awayî hûn şahdeyiyê ji karên bav
û kalên xwe re dikin û hûn wan
rast dibînin, ji ber ku bavên we
wan kuştin û hûn jî tirbên wan çê-
dikin. 49 Ji ber vê yekê, Zanyari-
ya[1] Xwedanî bi vî awayî got: Ez ê
ji wan re peyxamberan û şandiyan
bişînim; dê hinekan ji wan bu-
kujin û hinekan jî bidin cefayê;
50 da ku, bila ji dema dinya çêbûyî
ve, xwîna hemû peyxamberan ya
ku hatiye rijandin, ji vê nifşê were
xwestin; 51 ji xwîna Habîl, heta
xwîna Zekerya, yê ku di neqe-
ba gorîgeh û Perestgehê de hate
kuştin; belê, ez ji we re dibêjim ku,
dê ji vî nifşî were xwestin! 52 Wey
li we alimên zagonê! Ji ber ku we
rahiştiye nifta zanînê, hûn bi xwe
ne ketin hundir û yên dixwestin
bikevin hundir jî, we nehişt bike-
vinê! 53 Gava Îsa ji wir derdiket,
alimên zagonê û Fêrisiyan, li ser
pirr tiştan ji wî pirs kirin û wî dan
tengahiyê; 54 wan xwe li ber ve-
dabûn ku, bona bi gotinekê ji devê
wî derdikeve, wî bixin kemînê.

*Îkaza li dijî durûtiyê*

Met 10,16-39; 16,6-12; Marq 8,14-21

12 Di vê navberê de, gava bi
hezaran mirov mîna ku hev
û din bieciqînin, kom bi kom di-
civiyan; Îsa pêşiyê ji şagirtên xwe
re dest pê kir û got: Xwe ji havêna
Fêrisiyan biparêzin; ew durûtî ye!
2 Lê belê tiştekî nixumandî nîne
ku, xuya nebe û tiştekî veşartî
nîne ku, neyê zanîn. 3 Ji ber vê
yekê, her tiştê ku we di tariyê de
gotiye, dê di ronahiyê de were
bihîstin û tiştê ku we di hundir de
di guh de gotiye, dê li ser banan
were bang kirin.
4 Lê belê ez ji we hevalên xwe re
dibêjim: Ji kesên bedenê dikujin

[1] Hikmet.

û ji pê ve nikarin tiştekî xerabtir bikin, metirsin. 5 Lê belê ez nîşanî we bidim ku, ka hûn ê ji kê bitirsin: Ji wî kesê ku piştî dikuje, dikare bavêje dojehê ve bitirsin! Belê, ez ji we re dibêjim; ji wî bitirsin! 6 Ma pênc civîk bi du pere[1] ve nayên firotin? Lê belê dîsa, Xwedê yek jî ji wan ji bîr nekiriye. 7 Mîna vêya hemû mûyên serên we bi xwe jî jimartî ne. Ji ber vê yekê metirsin! Hûn ji gellek civîkan hîn jî hêjatir in.

8 Lê belê ez ji we re dibêjim: Her kî min li ber mirovan, bi eşkeretî qebûl bike, dê Lawê Mirov jî wî li ber milyaketên Xwedê bi eşkeretî qebûl bike; 9 lê belê kî min li ber mirovan înkar bike, dê ew jî li ber milyaketên Xwedê were înkar kirin. 10 Û kî li dijî Lawê Mirov gotinê bibêje, dê jê re were bexşandin, lê belê ji yê ku li dijî Ruhê Pîroz kufir dike re nayê bexşandin. 11 Gava we bibin keniştan, ber serok û fermandaran, xeman nexwin, hûn ê çawa û çi bersivê bidin, an çi bêjin; 12 ji ber ku Ruhê Pîroz, dê we di wê saetê de hîn bike ku, divê ka hûn çi bibêjin.

*Wekoka dewlemendê bêaqil*

13 Û yekî ji nava civakê ji Îsa re got: Ya Mamoste, ji birayê min re bibêje ku, ew wêristiyê bi min re par bike! 14 Îsa ji wî re got: Ya zilamo, kê min li ser we bi darazkirî an jî parkirê mêrasê wezîfedar kiriye? 15 Û wî ji wan re got: Bala xwe bidinê û xwe ji hemû çavbirçîtiyan biparêzin! Ji ber ku jiyana mirov, ne bi pirrbûna hebûna wî ye[2].

16 Û wî wekokekê ji wan re got û axifî: Zeviyên zilamekî dewlemend, zadekî zêde da. 17 Ew fikirî û di dilê xwe de got: Cîh nemaye ku ez dexila xwe biximê; gelo ez çi bikim? 18 Û wî got: Ez ê ûsa bikim: Ez ê embarên xwe xera bikim û yên hîn mezintir ava bikim û ez ê hemû dexl û malê xwe di wan de kom bikim. 19 Û ez ê ji canê xwe re bêjim: Ya can, te ji xwe re têra pirr salan mal hilaniye; li rihetiya xwe binihêre, bixwe, wexwe û şa bibe! 20 Lê belê Xwedê ji wî re got: Hê bêaqilo! dê îşev canê te ji te bê stendin; ma dê ew malê ku te amade kiriye ji kê re bimîne? 21 Kesê ku bona xwe xezîneyan berhev dike û li cem Xwedê ne dewlemend e, wusa ye!

*Xemê nexwin*

Met 6,19-34; 1.Tîm 6,6-10; Îbr 13,5

22 Û Îsa ji şagirtên xwe re got: Ji ber vê yekê, ez ji we re dibêjim: Ji bo jiyana xwe xeman nexwin ku, hûn ê çi bixwin û ji bo bedena xwe

---

1 Li rasteka menan binêrin.

2 Ne bi pirrbûna malê wî, an jî: Ne bi pirrbûna dewlemendiya wî ye.

jî xem nekin ku, hûn ê çi li xwe-
kin. 23 Ji ber ku jiyan ji xwarinê û
beden jî ji li xwe kirinê hêjatir e.
24 Li qirikan binihêrin, ew ne
diçînin, ne jî didirûn, ne kewarên
wan, ne jî embarên wan hene û
Xwedê dîsa jî wan xwedî dike; hûn
çiqasî ji teyrikan hêjatir in! 25 Ma
kî ji we bi xemxwarinê dikare ge-
zekê[1] bi ser jiyana xwe ve dirêjtir
bike? 26 Ûsa ku, ger hûn nikarin
tiştekî herî biçûk jî bikin, çima
hûn bona tiştên din xeman dixwin?
27 Li sosinan binihêrin, çawa me-
zin dibin; ew ne kar dikin, ne jî rîs
dirêsin û ez ji we re dibêjim: Silê-
man jî di hemû rûmeta xwe de wek
yekê ji wan, li xwe nekiribû! 28 Lê
belê ew gîhayê ku îro di zeviyê de
xuya dike û sibê dê bi nav firinê ve
bête avêtin, ger Xwedê wî ûsa bi cil
bike, ma dê we çiqasî zêdetir bi cil
bike, ya bawerî kêmno? 29 Hûn li,
ka hûn ê çi bixwin û ka çi vexwin
negerin û di dudiliyê de jî nebin!
30 Ji ber ku hemû gelên dinê tim
li vana digerin; Bavê we jî dizane
ku hûn motajî van tiştan in. 31 Lê
belê hûn li Serweriya wî bigerin û
ev tiştana dê ji we re bên dayîn!

*Dewlemendiya ezmanî*

Met 6,19-21

32 Metirse, ya keriyê biçûk; ji ber
ku Bavê we razî hatiye ku Ser-
weriyê bide we. 33 Çi tiştê we yî
heye, bifiroşin û bi xêran bidin!
Ji xwe re kîsikên ku kevin nabin
û xezînên li ezmanan kêm nabin
çêkin; li wê derê diz nêzîk nabe û
bizûzk jî naxwe. 34 Ji ber, xezîna
we li ku derê be, dilê we jî dê li
wê derê be.

*Xulamê hişyar*

Met 24,42-51; 25,1-30; Marq 13,33-37

35 Bila pişta we girêdayî be û çi-
rayên we vêketî bin; 36 hûn jî wekî
zilamên ku, li hêviya efendiyê xwe
sekinîne ku, gava ew ji dawetê ve-
gere û li derî bixe, hema bikarin ji
wî re vekin bin. 37 Xwezî li wan
xulaman ku, çaxê efendiyê wan
bê, ew wan hişyar bibîne! Ez ya
rast ji we re dibêjim: Ew ê pişta
xwe girêde, wan li sifrê rûnîne û
dê were û xizmetê ji wan re bike.
38 Ger ew di nobeta duwemîn de
an di nobeta sêwemîn de bê û wan
xulaman ûsa bibîne, xwezî li wan
xulaman! 39 Lê belê vêya bizanin
ku, ger xwediyê malê bizanîbûya
ku, diz dê kengê bê, ew ê hişyar
bimaya û nedihişt ku xaniyê wî qul
bike. 40 Hûn jî amade bin, ji ber
ku Lawê Mirov dê di saetekê de bê
ku, ne di gûmana we de ye.
41 Pêtrûs got: Ya Xudan, ma
tu vê wekokê ji me re an ji her
kesî re dibêjî? 42 Û Xudan got:
Ma ew wekîlê rast û baqil kî ye,
yê ku efendiyê wî ew daniye

[1] Li rasteka menan binêrin.

ser xulamên xwe ku, xwarina
wan di wextê wan de bide wan?
43 Xwezî li wî xulamî ku gava
efendiyê wî bê, wî bibîne ku
ûsa dike! 44 Ez bi rastî ji we re
dibêjim: Dê efendiyê wî, wî dey-
ne ser hemû malên xwe. 45 Lê
belê ger ew xulam di dilê xwe de
bêje: Efendiyê min di hatina xwe
de dereng dimîne û dest pê bike li
xulam û cariyan bixe, bixwe û ve-
xwe û serxweş bibe, 46 efendiyê
wî xulamî, dê di rojekê de bê ku,
ew ne li hêviya wî ye û di saetekê
de ku, ew pê nizane û dê wî bike
du parî û para wî bi bêbawermen-
dan re bide. 47 Ew xulamê ku
daxwaziya efendiyê xwe dizanî
jî, lê amadekarî nekiriye û ne jî bi
daxwaziya efendiyê xwe kiriye,
dê zehf lêdanê bixwe; 48 lê belê
ew ê ku bêzanîn û tiştên ku liyaqî
lêdanê ne kiriye, dê hindik lêdanê
bixwe. Ji ber ku ji kê re zehf ha-
tibe dan, dê zehf ji wî bê xwestin
û ji kê re zehf hatibe spartin, dê ji
wî bêtir bê xwestin.

*Îsa dibe sedema cûdabûnê*

Met 10,34-36

49 Ez hatime ku agir bavêjim
dinê; min çiqas dixwest ku ew
niha pêketî be! 50 Lê belê vaftî-
zek min heye ku ez ê bi wê vaftîz
bibim û heta ku ew bê cîh, ez çi-
qas jî tengasî dikişînim! 51 Ma
hûn gûman dikin ku, ez hatime
dilxweşiyê bînim dinê? Ez ji we
re dibêjim: Na, lê belê hîn ji wê
bêtir ez hatime ku, cudabûniyê
bînim! 52 Ji ber ku ji niha pê ve
di malekê de pênc kes dê hebin,
sisê ji duduyan û dudo ji sisiyan
dê cuda bibin. 53 Bav dê li dijî
law rabe û law li dijî bavê, dayik
li dijî keçê û keç li dijî dayikê,
xwesû li dijî bûkê û bûk li dijî
xwesûyê rabe.

*Hewcedariya zanîna demê*

Met 5,25-26; 16,2-3;

54 Û Îsa ji gel re jî got: Dema
hûn dibînin ku, ewrek li rojavayê
bilind dibe, hema hûn dibêjin:
Dê baran bibare! û ûsa dibe.
55 Û Gava ku bayê başûr tê, hûn
dibêjin: Dê zehf germ bibe! û ûsa
dibe. 56 Hey durûno! Hûn rewşa
rûyê erd û ezmên kifş dikin, lê
belê çawa dibe ku hûn vê demê
kifş nakin? 57 Û çima hûn biryara
xwe nadin, ka çi ya rast e? 58 Ji
ber ku çaxê tu bi neyarê xwe re
diçî darazkirê dadgehê, di rê de
bixebite tu ji wî xelas bibe ku,
ew te nekişîne ber dadger û dad-
ger te nede dest paspan[1] û ew jî
te neavêje girtîgehê. 59 Ez ji te re
dibêjim: Heta tu pûlê[2] paşî nedî,
tu ji wê derê dernakevî!

---

1 Gardiyan, pawan.

2 Li rasteka menan binêrin.

*Dawiya kesên ji gunehan venegere mirin e*

Hêz 18,27-32; Yû 8,24; Rom 2,3-6

13 Di wê demê de hin kesên
li wir bûn, ji Îsa re li ser
Celîliyan digotin, yên ku Pîlato
xwîna wan tevlî qurbanên wan
kiribû. 2 Îsa bersivê da wan û got:
Ma hûn dibêjin qey, Celîliyên ku
ev tiştan hatin serê wan, ji Celîli-
yên din gunehkartir bûn? 3 Ez ji
we re dibêjim: Na! Lê belê ger
hûn tobe nekin, hûn ê hemû ûsa
helaq bibin! 4 An ew her hijdehên
ku birca li Şîloahê bi ser wan de
ket û ew kuştin, ma hûn dibêjin
qey sûcên wan, ji yên hemûyên
ku li Orşelîmê dijîn, bêtir bûn?
5 Ez ji we re dibêjim: Na! Lê belê
ger hûn tobe nekin, hûn ê hemû
ûsa helaq bibin!
6 Û Îsa ev wekoka jî ji wan re
got: Di rezê mirovekî de dareke
hêjîrê çandî hebû û ew hat ku, li
berê bi darê ve bigere, lê nedît.
7 Û wî ji rezvan re got: Ev sê sal
e, ez têm û li berê vê dara hêjîrê
digerim û nabînim. Wê bibire!
Ma ji bo çi ew erdê bêkêr bike?
8 Rezvan bersiv da û jê re got:
Efendî, îsal jî wê bihêle, heta ku
ez hawirdora wê bikolim û zibil
bikim; 9 ger ev sala ku bê, wê ber
da, qenc e, lê belê ger neda, tuyê
wê bibire!

*Îsa pîrekek kûd baş dike*

10 Îsa roja Sebtê di kenîştekê de
dida hîn kirin. 11 Û a vay, li wir
pîrekek hebû ku, ji hîjdeh salî ve
ruhekî nexweşiyê di wê de ye; ew
kûd bûbû û qet nikarîbû pişta xwe
rast bikira. 12 Gava Îsa wê dît,
bangî wê kir û got: Ya pîrekê, tu ji
nexweşiya xwe azad bûyî! 13 Wî
destên xwe danî ser wê, pîrek di wê
gavê de rast bû û pesnahiya Xwedê
kir. 14 Lê belê serokê kenîştê, ji ber
ku Îsa di roja Sebtê de qenc dikir[1]
bi hêrsê ve ket, bersiv da û ji gel re
got: Şeş roj heye, divê ku mirov di
wan de kar bike; di wan rojan de
werin û xwe ji nexweşiyên xwe bi-
din baş kirin û ne di roja Sebtê de!
15 Lê belê Xudan bersivê da wî û
got: Hey durûno! Ma her yek ji we
roja Sebtê ga an kerê xwe ji afir
venake û nabe ser avê? 16 Lê belê
ev pîreka, ya ku keçika Birahîm
e, a vay, ev hîjdeh sal bû Îblîs wê
girêdabû, ma bila ew di roja Seb-
tê de ji vê qeydê nehatiba vekirin?
17 Û gava wî ev tişt got, dijraberên
wî hemû fihêtkar bûn û hemûya
ajawê bi hemû kerametên rûmetî
ku wî dikir ve kêfxweş dibûn.

*Serweriya Xwedê mîna çî ye?*

Met 13,31-33; Marq 4,30-32

18 Wê çaxê Îsa got: Ma Serwe-
riya Xwedê mîna çî ye? Û ez wê
bikim mîna çi? 19 Ew mîna tova
xerdelê ye ku, mirovekî wê girt û

---

[1] Şîfa dida.

avête bexçê xwe. Û ew şîn hat û
bû dar û teyrên ezmanê jî hêlînên
xwe li ser guliyên wê çêdikirin.
20 Û Îsa dîsa got: Ma ez Serweri-
ya Xwedê bikim mîna çi? 21 Ew
mîna havên e ku pîrekek wê rahişt
û di nav sê çap ard de stira, heta
hemû tirş bû.

*Deriyê teng*

Met 7,13-14; 7,21-23; 8,11-12

22 Û Îsa ji nav gund û bajaran
re derbas dibû, hîn dikir û ber bi
Orşelîmê ve diçû. 23 Yekî ji wî re
got: Ya Xudan, ma hejmara kesên
ku xelas bibin, hindik in? Îsa ji
wan re got: 24 Bona ku, hûn ji
deriyê teng ve derbas bibin li ber
xwe bidin! Ji ber ku ez ji we re
dibêjim, dê gellek bixwazin ku,
bikevin hundir û dê nikaribin.
25 Dema xwediyê malê rabe û
carekê derî bigire, hûn ê ji derve,
li ber derî bimînin û dest pê bikin,
li derî bixin û bêjin: Ya Xudan, ji
me re veke! Ew ê jî bersiva we bi
gotina: Ez nizanim hûn ji ku derê
ne! bide we. 26 Îcar hûn ê dest
pê bikin û bêjin: Me ji pêş te ve
dixwar û vedixwar û te di kûçeyên
me de hîn dikir! 27 Lê belê dê ew
ê bibêje: Ez ji we re dibêjim: Ez
nizanim hûn ji ku derê ne; ji ber
çavê min herin, hûn hemûyên
karkerên neheqiyê!
28 Gava hûn di Serweriya Xwe-
dê de Birahîm, Îshaq û Aqûp û
hemû peyxamberan bibînin û
hûn ê xwe bi derve avêtî bibînin;
dê li wê derê qirçeqirça diranan
û girî bibe! 29 Dê ew ji rojhilat
û rojava, ji bakur û başûr werin
û di Serweriya Xwedê de li sifrê
rûnin. 30 Û a vay, hin hene paş in,
dê bibin yên pêş û hin hene li pêş
in, dê bibin yên paş.

*Îsa bona Orşelîmê digirî*

Yêr 6,6-15; Met 23,27-39; Lûq 19,41-44

31 Hema di wê navberê de
hinekan ji Fêrisiyan hatin û ji Îsa
re gotin: Rabe ji vê derê here, ji
ber ku Hêrodês dixwaze te bikuje!
32 Û Îsa ji wan re got: Herin, ji
wî roviyî re bêjin: A vay, ez îro
û sibê cinan derdixim, nexweşan
qenc dikim û roja sisiyan temam
dibe. 33 Lê belê divê ez îro, sibê û
dusibê bi rêya xwe ve herim, ji ber
nabe ku, peyxamberek ji derveyî
Orşelîmê bête kuştin. 34 Orşelîm,
Orşelîma ku peyxamberan dikuje
û yên ji wê re hatin şandin, dide
ber keviran! Çend caran min xwest
ku ez zarokên te bicivînim, mîna
ku mirîşkek çêlikên xwe di bin
baskên xwe de dicivîne, lê belê we
nexwestin! 35 A vay, mala we dê ji
we re wêran[1] bimîne! Lê belê ez ji
we re dibêjim: Êdî hûn min nabînin,
heta wê çaxa ku hûn bibêjin: Yê bi
navê Xudan tê, bila pîroz be!

1 Xopan.

*Îsa zilamekî nexweş baş dike*

Met 12,9-13; Lûq 6,6-11; 13,10-17

14 Û wusa bû ku, rojekê
Sebtê Îsa çû mala serokekî
Fêrisiyan ku, xwarinê bixwe; wan
jî çavnêriya wî dikirin. 2 Û di wê
demê de zilamekî nexweş ku ava
zer ji bedena wî ve dihat, li ber wî
bû. 3 Û Îsa dest pê kir û ji alimên
zagonê û Fêrisiyan re got: Ma di
roja Sebtê de çêdibe ku, nexweş
bên baş kirin an na? 4 Lê belê
deng ji wan nehat. Û wî yê nexweş
rahişt, wî baş kir û berda. 5 Û wî
ji wan re got: Kî ji nav we ku,
lawê wî an gayê wî bikeve bîrekê,
ew wî roja Sebtê jî be, bi lezî jê
dernaxe? 6 Û wan nikarîbûn li dijî
vê yekê bersivê bidin.
7 Lê belê gava wî dît ku, yên hatine
bang kirin, çawa cîhên pêş ji xwe
re dibijêrin, wî ji wan re wekokekê
got: 8 Gava tu ji aliyê kesekî ve ji
bo dawetê were vexwendin[1], li cîhê
pêş ve rûnenê; dibe ku yekî ji te bi
qîmet ji aliyê wî ve hatibe bang ki-
rin 9 û yê bangî we herduyan jî ki-
riye, gava were û bibêje: Cîh bide
vî! Wê çaxê, tuyê bi şermezarî rabe
û derbasî cîhê herî paş be.
10 Lê belê gava tu bê bang kirin,
here û li cîhê paş rûne ku, ji bo yê
bangî te kiriye, dê bê û ji te re bi-
bêje: Hevalo, kerem bike, hilkişe
jor! Wê çaxê tuyê li pêş wan
hemûyên bi te re li sifrê rûniştî ve
serbilind bibî. 11 Ji ber her kesê ku
xwe bi xwe bilind bigire, dê were
nizim kirin û her kesê ku xwe ni-
zim bigire, dê were bilind kirin.
12 Û Îsa ji yê ku bangî wî kiri-
ye re jî got: Gava ku tu firavînekê
an şîvekê çêbikî, bangî hevalên
xwe, birayên xwe, mirovên xwe
û cîranên xwe yên dewlemend
meke; da ku, bila ew jî di berdêla
vêya de bangî te nekin û bila ji te
re nebe berdêl. 13 Lê belê çaxa
tu ziyafetekê bide, bangî xizan,
kûd, kulek û koran bike 14 û tuyê
dilxweş bibe; ji ber, tu tiştên wanî
berdêlê nîne ku bidin te; lê belê di
vejîna salihan de, dê berdêl ji te re
bête dayîn.

*Banga şîva birewnaqî*

Met 22,2-14

15 Û yekî ji yên ku bi Îsa re li sif-
rê rûniştî bûn, çaxê ev yek bihîst,
ji Îsa re got: Xwezî bi wî yê ku di
Serweriya Xwedê de nan bixwe!
16 Lê belê Îsa ji wî re got: Mirovekî
şîvekê mezin çêkir û bangî pirr mi-
rovan kir. 17 Û gava saeta şîvê
hat, xulamê xwe şand ku, bangî yê
vexwendî[2] bike û ji wan re bêje:
Werin, her tişt amade ye! 18 Û her
yekî ji wan dest pê kir û lêborîn ji
xwe re xwest. Yê pêşî jê re got:
Min erdek kiriye, divê ez herim û

[1] ...were bang kirin.

[2] Bangkirî.

lê binihêrim; ez ji te rica dikim ku,
tu min biborînî! 19 Û yekî din got:
Min pênc cot ga kiriye, ez diçim ku
wan biceribînim; ez ji te rica dikim
ku, tu li min biborînî! 20 Yekî din
jî got: Min ji xwe re pîrekek aniye
û îcar ez nikarim bêm! 21 Yê xu-
lam vegeriya û ev tişt ji efendiyê
xwe re got. Li ser vê xwediyê malê
hêrs bû û ji xulamê xwe re got: Bi
lez here derve, nav qad û kolanên
bajêr, belengaz û kûd û kor û kule-
kan bîne hundir! 22 Û xulam got:
Efendî, emrê ku te da pêk hat, lê
belê hîn cîh heye! 23 Û efendî ji
xulêm re got: Rabe, derkeve ser
riyan û sêncan, bi zorê wan bîne
hundir ku, bila mala min tijî bibe!
24 Ji ber ku ez ji we re dibêjim, ji
wan zilamên ku hatine bang kirin,
yek jî ji şîva min tam nake!

*Şertên Şagirtiyê*

Met 10,37-38; 16,24-26

25 Ajaweyên mezin, yên ji gel bi
Îsa re diçûn û ew zivirî û ji wan
re got: 26 Ger mirovek were cem
min û ji dayik û bavê xwe, jin û
zarokê xwe, bira û xwuşkên xwe,
belê, heta ji canê xwe nefret neke,
ew nikare bibe şagirtê min. 27 Û
kî xaça xwe hilnegire û li pey min
nê, nikare bibe şagirtê min.
28 Ji ber ku ma kî ji we, bixwa-
ze bircekê ava bike, pêşî rûnane,
mesrefa wê nahesibîne, ka tiştên
wî hene ku, pê bibe serî? 29 Da
ku, dema bingehê bavêje û nika-
ribe wê xelas bike, hemûyên ku
wî bibînin dê dest pê bikin, qer-
fên xwe bi wî bikin 30 û bêjin: Vî
zilamî dest bi avakirinê kir û hêz
neanî ku biqedîne! 31 An kîjan
qiral, dema here pêşiya qiralekî
din ku, bi wî re bikeve cengê, pêşî
rûnane, naşêwire, ka ji wî tê ku ew
bi deh hezaran here pêşiya wî yê
ku bi bîst hezaran bi ser wî de tê?
32 Ger na, gava qiralê din, hîn gel-
lekî li dûra ye, qasidan dişîne û di-
pirse; ka dê çawa aşitî bibe. 33 Bi
vî awayî, her kî ku ji we mîna vêya
dev ji hemûya hebûna xwe berne-
de, nikare bibe şagirtê min.
34 Xwê qenc e; lê belê ger wê
tama xwe winda kir, dê bi çi were
bi tam kirinê? 35 Ew êdî ne bi
kêrî axê û ne jî kêrî ziblê tê, wê
davêjin derve. Yê ku guhên wî ji
bihîstinê re hebe, bila bibihîze!

*Wekoka mîha windabûyî*

Met 18,11-14

15 Hemû bacgir û gunehkar
bona ku wî guhdarî bikin,
ber bi Îsa ve dihatin. 2 Fêrisî û
alimên zagonê pitepit kirin û go-
tin: Ev zilama gunehkaran qebûl
dike û bi wan re dixwe!
3 Lê belê Îsa ji wan re vê wekokê
got û axifî: 4 Kî ji we ku, sed mîhên
wî hebin û yek ji wan winda bibe,
ma her nod û nehên din li çolê
nahêle û naçe li ya windabûyî na-

gere, heta ku wê bibîne? 5 Û gava
ew wê bibîne, wê bi şahî datîne ser
milê xwe 6 û dema ew vedigere
malê, bangî heval û cîranên xwe
dike û ji wan re dibêje: Hûn jî bi
min re şa bibin, ji ber ku min mîha
xwe ya windabûyî dîtiye! 7 Ez ji
we re dibêjim: Bi vî awayî, bona
gunehkarekî ku tobe dike, li ezma-
nan, ji nod û neh kesên salih, yên
ku tobekirina wan ne hewce ye,
zêdetir dilşahî bibe!

*Wekoka zîvê windabûyî*

8 An jî kîjan pîrek ku, deh zîvên
wê hebe û yekî ji wan winda bike,
ew çirayê vênaxe û xênî namale
û qenc lê nagere ku, heta wê bi-
bîne? 9 Û gava ew wî bibîne, ma
ew bang nake heval û cîranên
xwe û ji wan re nabêje: Hûn jî bi
min re şa bibin, ji ber ku min zîvê
xwe yî windabûyî dîtiye! 10 Bi vî
awayî, ez ji we re dibêjim: Li ber
milyaketên Xwedê ji bo gunehka-
rekî ku tobe dike, dilşayî dibe.

*Wekoka Lawê windabûyî*

11 Û Îsa got: Du lawên zilamekî
hebûn. 12 Û ji vana yê biçûk ji bavê
xwe re got: Bavo, ka ji malê xwe
wê para ku ji min re dikeve, bide
min! Wî malên xwe li wan par kir.
13 Û piştî çend rojan lawê biçûk,
her tiştên xwe da hev û çû welatekî
dûr û li wir wî bi ewaretî malên
xwe tert û belav kir. 14 Û piştî ku
wî her tiştên xwe xerc kir, xelayekî
dijwar bi ser wî welatî ve hat û ew
jî bi xizaniyê ve hayîdar bû 15 û
çû xwe li yekî ji gelên wî welatî
girt; wî zilamî jî ew şand nav erdên
xwe, ber berazan. 16 Û wî dixwest
ku zikê xwe bi wê xernûfa ku be-
razan dixwar, têr bike û kesekî wê
nedidayê.

17 Û gava hişê wî hate serê wî, ji
xwe re got: Ewqas palên bavê min
hene ku, xwarin ji ber wan dimîne
û ez dikim li vê derê ji birçîbûnê
bimirim! 18 Ez ê rabim, li bavê
xwe vegerim û jê re bêjim: Bavo,
min li ber te û li dijî ezmên guneh
kiriye 19 û ez êdî ne hêja me ku
wekî lawê te bême gotin; wek yekî
ji paleyên xwe min qebûl bike!
20 Û ew rabû û vegeriya cem
bavê xwe. Lê belê gava ew hîn ji
dûr ve bû, bavê wî ew dît û dilê
wî bi lawê wî şewitî û ew baz da,
histuyê wî hembêz kir[1] û ramû-
sand. 21 Lê belê lawê wî jê re got:
Bavo, min li ber te û li dijî ezmên
guneh kiriye û ez êdî ne hêja me
ku wekî lawê te bême gotin!
22 Lê belê bav, bi vî awayî ji xu-
lamên xwe re got: Bilezînin û he-
rin kincên herî qenc bînin û li wî
bikin û gustîlkekê têxin tiliya wî û
solan[2] bixin lingên wî 23 û golika

[1] Wî da ber sînga xwe.

[2] Pêlav, an jî: Çaroxan.

dermalekirî bînin û serjêkin ku,
em bixwin û kêfxweş bibin! 24 Ji
ber ku ev lawê min mirî bû û rabû,
ew windabûyî bû û hate dîtin. Û
wan dest bi kêfxweşiyê kirin.
25 Û lawê wî yê mezin li zeviyê
bû; gava ew vegeriya û nêzîkî malê
bû, dengê stran û govendê bihîst.
26 Wî bangî yekî ji xulaman kir û
jê pirsî, ma ev çî ye? 27 Yê xulam
jê re got: Birayê te hatiye, bavê te
congeya dermalekirî serjêkiriye, ji
ber ku ew bi saxî gîhaşt wî!
28 Lê belê zilamê ciwan hêrs bû û
nexwest ku here hundir; bavê wî
derket û jê hêvî kir. 29 Lê belê wî
bersiv da û ji bavê xwe re got: A
vay, ewqas sal e, ez ji te re xizmetê
dikim û ez tu carî ji emrê te derne-
diketim û te tu carî karikek neda
min ku, ez bi hevalên xwe re pê
şa bibim. 30 Lê belê gava ev lawê
te, yê ku malên te bi pîrekên xerab
re xwar, vegeriya, tu rabû û golika
dermalekirî ji wî re serjêkir!
31 Û bav jê re got: Lawo, tu her
tim bi min re yî, her tiştên ku yê
min in, yên te ne. 32 Lê belê divê
em şahiyê bikin û kêfxweş bibin, ji
ber ku ev birayê te mirî bû û rabû,
ew windabûyî bû û hate dîtin!

*Wekoka Keyayê bêbext*

16 Lê belê Îsa ji şagirtên xwe
re jî got: Keyayekî mirovekî
dewlemend hebû û rojekê giliyê
vî keyayî li cem efendiyê wî hat
kirin ku, ew malên wî tert û be-
lav dike. 2 Û wî bangî keya kir û
jê re got: Ev çî ye ku, ez di der-
heqê te de dibihîzim? Ka hesêbê
keyatiya xwe bide, ji ber ku tu êdî
nikarî keyatiyê bikî! 3 Keya jî ji
xwe re got: Ka ez ê niha çi bikim?
Ji ber ku dê efendiyê min, keya-
tiya min ji destê min bistîne; ko-
lan ji min nayê ku ez bikim û ez
şerm dikim ku parsekiyê bikim.
4 Dema ji keyatiyê bême qewi-
randin, ez dizanim ka bona ku
ew min qebûlî malên xwe bikin,
ez ê çi bikim! 5 Û wî yek û yek
bangî deyndarên efendiyê xwe
kir; ji yê pêşî re got: Tu bi çiqasî
deyndarê efendiyê min î? 6 Wî
got: Bi sed kûp zeytê. Keya jê
re got: Rahêje seneda xwe û bi
lez rûne, pênciyî tê de binivîse!
7 Paşê wî ji yekî din re got: Tu bi
çiqasî deyndar î? Û wî jî got: Bi
sed pîvan[1] genim. Keya ji wî re jî
got: Rahêje seneda xwe û heyştêyî
tê de binivîse! 8 Û efendî pesnê wî
keyayê xapînokî da, ji ber ku wî bi
aqilmendî kiribû. Ji ber zarokên vê
dinê di danûstendina xwe de li gor
nifşê xwe ji zarokên ronahiyê ba-
qiltir in. 9 Û ez ji we re dibêjim: Bi
mammonê[2] neheqiyê ji xwe re he-
valan çêkin ku, ji bo gava ew nemî-

1 Li rasteka menan binêrin.

2 Dewlemendî.

ne jî, bila we li bin konên bêdawî
qebûl bikin! 10 Ew ê ku di tiştekî
hindik de ewle be, ew di tiştekî pirr
de jî ewle ye; lê belê yê ku di tiştekî
hindik de ne ewle be, ew di tiştekî
pirr de jî ne ewle ye. 11 Niha ger
di mammonê neheqiyê de ewlehî
bi we neyê kirin, dê kî ewlehiyê bi
we bîne ku, heyîna rastî bide we?
12 Ger hûn di tiştên hinên din de
bê ewlehî bin, dê kî ya we, bi xwe
bide we? 13 Tu xulamek nikare ji
du efendiyan re xulamtiyê bike; ji
ber ku dê an ji yekî bikeribe û ji
yê din hez bike, an jî dê qedrê yekî
bigire û yê din kêm bibîne. Hûn
nikarin xulamtiyê ji Xwedê re û ji
mammon[1] re bikin!

*Zagon (Şerîet) û Serweriya Xwedê*
Met 11,12-13; 5,31-32; Marq 10,11-12

14 Û Fêrisiyan, ku ji pere hez di-
kirin, ev tiştan hemû bihîstin û he-
nekên xwe bi Îsa dikirin. 15 Îsa jî
ji wan re got: Hûn in yên ku xwe
li ber mirovan ve bi rûsipîtî derdi-
xin, lê belê Xwedê bi dilê we di-
zane; ji ber ku tiştê di nav mirovan
de bi qîmet e, li ber çavên Xwedê
erjeng e.
16 Dema zagonê û peyxamberan
heta bi hatina Yehya kişand; ji
hingê û vir ve Mizgîniya Serweri-
ya Xwedê tê dan û her kes bi zorê
dikeve nav wê. 17 Lê belê bihûr-
tina erd û ezmanan, ji ketina nox-
teyeke zagonê hêsanîtir e.
18 Her yekê ku jina xwe berde û
bi jineke din re bizewice, ew zina-
kariyê dike û her kesê ku bi jineke
ji mêrekî berdayî re bizewice, ew
zinakariyê dike.

*Zilamê dewlemend û Lazarê xizan*

19 Mirovekî dewlemend hebû
ku, kincên ji erxewanî û ji kitanê
buha li xwe dikir; wî hemû rojan
dixwar, vedixwar û ew bi kêf û
şahiyê dijiya. 20 Û li ber deriyê wî
xizanek bi navê Lazar hebû ku, li
wir dihat ramedandin[2]; bedena wî
tijî birîn bû. 21 Û çavên wî li wê
bû ku ew xwe bi wan bermayîkên
ku ji sifra yê dewlemend diketin,
têr bike û kûçik jî dihatin û birînên
wî dialêstin. 22 Û wusa bû ku, yê
xizan mir û milyaketan wî birin
xistin himbêza Birahîm. Û yê
dewlemend jî mir û hate veşartin.
23 Gava wî di warê miriyan de
ezab dikişand û çavê xwe hilda,
wî ji dûr ve Birahîm dît ku, Lazar
di himbêza wî de ye. 24 Û wî
bang kir û got: Ya Bavo Birahîm,
dilovaniyê li min bike! Lazar
bişîne, bila ew serê tiliya xwe di
avê de bike û zimanê min hênik
bike; ji ber ku ez di nav vê pêtê[3]

[1] Dewlemendî.
[2] Dihat dirêjkirin.
[3] Xurî, guriya agir.

de ezabê dikişînim! 25 Lê belê
Birahîm got: Lawo, bîne bîra xwe
ku, çi tiştên baş hebûn, te di jiyana
xwe de distend û çi tiştên xerab
hebûn ku, digihîştin Lazar; niha
li vir, ew tête xemrevîn kirin û tu
ezabê dikişînî. 26 Ji vana hemûyan
pê ve, ji bo yên ku dixwazin ji vê
derê derbasî cem we bin û yên ku
dixwazin ji wê derê derbasî cem me
bin, nikaribin derbas bibin, di nav
me û we de geliyekî mezin hatiye
danîn. 27 Û wî jî got: Ger wusa
be, ya Bavo, ez li ber te digerim
ku, tu wî bişînî mala bavê min; 28
ji ber ku pênc birayên min hene,
bila ew rastiyê ji wan re bêje ku,
ji bona ew jî neyên vî cîhê ezabê!
29 Lê belê Birahîm ji wî re got:
Mûsa û peyxamberên wan hene,
bila guhên xwe bidin wan! 30 Lê
belê wî got: Na, ya bavo Birahîm,
ger yek ji nav miriyan rabe û here
cem wan, ew ê tobe bikin! 31 Û
Birahîm ji wî re got: Gava ew guhê
xwe nedin Mûsa û peyxamberan,
ger yek ji nav miriyan jî rabe, ew
bawer nakin!

*Aliyên gunehê yên cihê*

Met 18,6-9; 18,21-35; Marq 11-22-26

**17** Û wî ji şagirtên xwe re
got: Nehatina tilpekîbûnan
nabe; lê belê wey li wî mirovê ku,
bi navgîniya wî ve tê! 2 Dê ji wî re
çêtir be ku, kevirê aşekî bi histuyê
wî ve were girêdan û bi nav behrê
ve bête avêtin, ji dêvla ku ew yekî
ji wan biçûkan tilpekî bike. 3 Hay
ji xwe hebin! Gava birayê te li dijî
te sûcekî bike, wî biazirîne û ger
ew tobe bike, hingê lê biborîne.
4 Û ger ew di rojê de heft caran
li dijî te sûc bike û heft caran li te
vegere û bêje: Ez tobe dikim, divê
ku tu li wî biborîne.

*Hêza baweriyê*

5 Û şandiyan ji Xudan re gotin:
Baweriya me zêde bike! 6 Xudan
got: Ger baweriya we wek libek
xerdelê jî hebûya, weyê ji vê dara
tûyê re bigotana: Ji kokê ve rabe
û here, xwe di behrê de biçikîne!
Û dê darê bi ya we bikira.

*Wezîfa xulam*

7 Ma kî ji we, ger xulamekî wî
hebe ku, şivantiyê an cotkariyê
bike, gava ew ji zeviyê vegere
malê, dê ji wî re bêje: Hema were
û li sifrê rûne? 8 Ma ew ê dêvla
vêya ji wî re nebêje: Rabe, pişta
xwe girêde, xwarina min amade
bike, heta ku ez bixwim û vex-
wim, xizmeta min bike û pişt re tu
jî bixwe û vexwe? 9 Ma ew ê sipa-
siya xulam bike, ji ber ku wî wan
tiştên ji wî re hatibûn emir dayîn,
kiriye? 10 Hûn jî bi vî awayî,
dema we her tiştên ku ji we re ha-
tiye emir dayîn, kirin, bibêjin: Em
xulamên bêkêr in; me van karê ku
li ser me deyn bûn, kirin!

*Îsa deh mirovên bicizam pak dike*

11 Û wusa bû ku, dema Îsa diçû
Orşelîmê, di nava Samîriya û
Celîlê ve derbas dibû. 12 Û gava
ew kete gundekî, deh mirovên
bicizam ku, ji dûr ve sekinî bûn,
rastî wî hatin. 13 Û wan bi den-
gekî bilind bang kirin û gotin:
Ya Îsa, ya Mamoste, dilovaniyê
li me bike! 14 Û gava Îsa wan
dît, ji wan re got: Herin û xwe
nîşanî kahînan bidin! Û wusa bû
ku, gava hîn ew diçûn, ji gurîtiya
xwe paqij bûn. 15 Û gava yekî ji
wan dît ku ew baş bû, vegeriya
û bi dengekî bilind pesnê Xwedê
da. 16 Wî xwe li ber lingên Îsa
avêt ser rûyê xwe û sipasiya wî
kir û ew yekî Samîrî bû. 17 Îsa
bersiv da û got: Ma ne her deh
hatine paqijkirin? Ka her nehên
din li ku derê ne? 18 Ma kesek
ji viyê xerîb pê ve venegeriya, ji
bo pesnê Xwedê bide? 19 Îsa ji
wî re got: Rabe ser xwe û here;
baweriya te tu xelas kirî!

*Hatina Serweriya Xwedê*

Met 24,29-31; Marq 4,26-29; 13,24-27;
Lûq 21,25-28

20 Gava ku ji aliyê Fêrisiyan ve
pirsa, dê Serweriya Xwedê ken-
gê were? ji Îsa re hate pirsîn; wî
bersiv da wan û got: Serweriya
Xwedê mîna ku bi çavan ve bê
dîtin nayê. 21 Ne jî mirov dikarin
bibêjin: A vay, li vir e! An jî: Li
wir e! Ji ber ku a vay, Serweriya
Xwedê di nava we de ye.
22 Îsa ji şagirtan re got: Dê roj
werin ku, hûn ê wê çaxê bixwa-
zin ji rojên Lawê Mirov rojekê
bibînin, lê belê hûn ê nikaribin
bibînin. 23 Û dê ji we re bêjin:
A vay, li vê derê ye! û: A vay, li
wê derê ye! Lê belê neçin û bi
pey nekevin! 24 Ji ber ku çawa
birûsk ji aliyekî ezmanan ve di-
biriqe û heta bi aliyê din ronahi-
yê dide, Lawê Mirov jî dê di roja
xwe de ûsa be. 25 Lê belê divê
ew pêşiyê pirr êşan bikişîne û ji
aliyê vî nifşê ve were red kirin.
26 Di roja Nûh de rewş çawa bû,
dê di rojên Lawê Mirov de jî ûsa
bibe: 27 Dixwarin, vedixwarin,
jin dianîn û mêr dikirin, heta roja
ku Nûh kete keştiyê û tofan rabû
û hemûyan helaq kirin. 28 Di ro-
jên Lût de jî rewş ûsa bû: Dixwa-
rin, vedixwarin, dikirîn, difirotin,
diçandin û ava dikirin. 29 Lê belê
roja ku Lût ji Sodomê derket, ji
ezmanan agir û kewkurd bariya
û hemûyan helaq kirin. 30 Dê di
roja ku Lawê Mirov xuya bibe de
jî, ûsa bibe. 31 Wê rojê kesê ku
li serê xanî be, bila ji bona tiştên
xwe ji hundir bîne, neyê xwar û
ew ê ku li nav zeviya xwe be, bila
ew jî venegere! 32 Pîreka Lût[1]
bînin bîra xwe! 33 Her kesê ku

[1] (1.Mûsa 19:26)

bona xelaskirina canê xwe bixe-
bite, dê wê winda bike; lê belê yê
ku canê xwe winda bike, dê wê
bijîne. 34 Ez ji we re dibêjim: Di
wê şevê de du kes dê di nav livî-
nekê de bin; yek ji wan dê were
birin û yê din were hiştin. 35 Ji
nav du pîrekên ku pev re genim
dihêrin, dê ji wan yek were bi-
rin û ya din were hiştin. 36 Dê
di zeviyê de du zilam hebin, dê
yek ji wan bê stendin, yê din jî
bête hiştin. 37 Û wan bersivê dan
û ji Îsa re gotin: Ma li ku derê, ya
Xudan? Û wî ji wan re got: Be-
rate li ku derê be, qertel jî li wê
derê dicivin.

*Wekoka jinebî û darazkir*

18 Û ji bo ku divê ew her tim
dua bikin û tu carî ranewes-
tin, wî wekokek ji wan re got:
2 Di bajarekî de darazkirek hebû
ku, ne ji Xwedê ditirsiya û ne jî ji
mirovan dişermiya. 3 Di wî ba-
jarî de jinebiyek jî hebû ku, di-
hat cem darazkir û ji wî re digot:
Heqê min ji dijminê min bistîne!
4 Û darazkir demekê guh neda
wê, lê belê pişt re ji xwe re got:
Her çiqas ez ne ji Xwedê ditirsim
û ne jî ji tu mirovî şerm dikim, 5
dîsa jî ez ê rabim, heqê wê bidim
wê ku, ji bo ev jinebiya her tim
neyê û min neêşîne. 6 Û Xudan
got: De îcar bibihîzin ku, da-
razkirê neheq çi dibêje! 7 Û her
çiqas Xwedê bona wan bisebir
be jî, ma qey dê mafê bijartiyên
xwe, yên ku şev û roj feryadê jê
re dikin, nestîne? 8 Ez ji we re
dibêjim: Ew ê heqê wan zû bistî-
ne! Lê dîsa jî gava Lawê Mirov
were, gelo ew ê baweriyê li ser
rûyê erdê bibîne?

*Wekoka Fêrisî û bacgir*

M.Sil 28,9; Aqûp 4,6-10; 1.Pêt 5,5-6

9 Îsa ji kesên ku xwe rast dibînin
û yên din hemûyan ji xwe ve kêm[1]
dibînin re vê wekoka jî got: 10 Du
mirov hilkişîn Perestgehê ku, dua
bikin; yek ji wan Fêrisî bû û yê din
bacgir bû. 11 Yê Fêrisî rabû û ji
xwe bi xwe re bi vî awayî dua kir:
Ya Xwedê, ez sipasiyê ji te re di-
kim ku, ez ne wek mirovên din im:
Rêbir, neheq, zînakar, an jî wek vî
bacgirê hanê. 12 Ez di heftiyê de
du carî rojiyê digirim û deheka
hemû qezenca xwe didim! 13 Lê
belê yê bacgir jî ji dûr ve rawes-
tabû û ne dixwest ku çavên xwe jî
ber bi ezmanan ve rake; wî li sîn-
ga xwe dixist û digot: Ya Xwedê
dilovaniyê li min gunehkarî bike!
14 Ez ji we re dibêjim: Ev zilam ji
yê din zêdetir salih hate hesiban-
din û çû mala xwe; ji ber her kesê
ku xwe bi xwe bilind bike, dê were
nizmkirin; lê belê kesê ku xwe
nizm bike, dê were bilindkirin.

---

*1* Bêrûmet.

*Îsa zarokan pîroz dike*

Met 19,13-15; Marq 10,13-16

15 Zarokên biçûk anîn cem Îsa
ku, ew destê xwe deyne ser wan.
Lê belê çaxê şagirtan ev yek dîtin,
wan dengê xwe li wan hildan.
16 Lê belê Îsa bangî wan kir ku,
bên cem wî û got: Bihêlin, bila
zarok bên cem min, pêşiya wan
negirin; ji ber ku Serweriya Xwe-
dê, ya yên ûsa ye. 17 Bi rastî ez
ji we re dibêjim: Kî Serweriya
Xwedê wek zarokên biçûk qebûl
neke, tu carî nakeve nav wê!

*Xortê dewlemend li jiyana bêdawî digere*

Met 19,16-30; Marq 10,17-31

18 Û serokekî ji Îsa re pirsa:
Mamosteyê qenc, bona ku ez
jiyana bêdawî mêras bigirim, divê
ez çi bikim? pirsî. 19 Îsa ji wî re
got: Çima tu ji min re dibêjî qenc?
Xeynî yekî tu kes ne qenc e, ew jî
Xwedê ye! 20 Tu emiran dizanî:
Tuyê zinê neke! Kuştinê neke[1]!
Nedize! Şahdeyiya bi derewî ne-
ke! Qedrê dayik û bavê xwe bi-
gire[2]! 21 Û wî got: Ji zarokantiya
xwe ve min bi hemûyên van
tiştan ve girtiye. 22 Û gava Îsa
vêya bihîst, ji wî re got: Hîn jî
kêmasiyek te heye: Çi tiştên te yî
hene, bifiroşe, li belengazan belav
bike û dê li ezmanan xezîna te
hebe û were, li pey min bimeşe!
23 Lê belê çaxê wî ev tiştê hanê
bihîst, zehf xemgîn bû, ji ber ku
ew zehf dewlemend bû.
24 Û gava Îsa dît ku, ew zehf
xemgîn bû, got: Çiqas zehmet
e ku, yên dewlemend bikevin
Serweriya Xwedê! 25 Ji ber ku
derbasbûna devê di qula derziyê
re hêsantir e, ji ketina dewlemend
di Serweriya Xwedê de. 26 Û
yê ku vana bihîstin, gotin: Ger
ûsa be, ma kî dikare xelas bibe?
27 Lê belê Îsa got: Tiştên ku li
cem mirovan ne mimkun in, li
cem Xwedê mimkun in[3]. 28 Û
Pêtrûs got: A vay, me her tiştên
xwe hiştine û em li pey te hatine!
29 Îsa ji wan re got: Bi rastî ez ji
we re dibêjim: Tu kes nîne ku ji
bo Serweriya Xwedê dev ji xanî,
an jin, an birayan, an dayik û bav,
an zarokan berdabe, 30 di vê dinê
de gellek bêtir û di dinya ku bê de
jiyana bê dawî nestîne!

*Îsa cara duwemîn li ser mirin û vejîna xwe dibêje*

Met 20,17-19; Marq 10,32-34

31 Û Îsa her Donzdeh girtin cem
xwe û ji wan re got: A vay, em der-
dikevin Orşelîmê û hemû tiştên ku
bi destê peyxamberan li ser Lawê

[1] Qetl neke.

[2] (2.Mûsa 20:12-16; 5.Mûsa 5:16-20)

[3] Tiştên ku mirov nikarin bikin, Xwedê dikare.

Mirov hatine nivîsandin, dê bên
cîhên xwe; 32 ji ber ku dê wî bi-
din destên netewan, dê qerfên xwe
bi wî bikin, dê heqaretê lê bikin û
tûyî ser wî bikin, 33 dê li wî bixin
û wî bikujin û ew ê roja sisiyan dê
biveje. 34 Wan tuyên van tiştan
fêhm nekirin; ev gotin ji wan re
veşartî ma û tiştên ku hatin gotin
fêhm nekirin.

*Îsa yekî kor baş dike*

Met 20,29-34; Marq 10,46-52

35 Û wusa bû ku, Îsa gava nêzîkî
bajarê Erîhayê dibû, yekî kor li
tenişta rê rûniştibû û parsê dikir.
36 Û gava wî bihîst ku ajaweyek
derbas dibe, pirsî û got: Ma ev
çî ye? 37 Lê vegerandin û gotin:
Îsayê Nisretî derbas dibe. 38 Yê
kor qêriya û got: Ya Lawê Dawid
Îsa, dilovaniyê li min bike! 39 Û
yên ku di pêşiyê de diçûn, bona ku
ew devê xwe bigire, dengê xwe li
wî hildan; lê belê ew hîn jî bêtir
qêriya û got: Ya Lawê Dawid,
dilovaniyê li min bike! 40 Îsa se-
kinî, emir da ku, yê kor bînin cem
wî û dema yê kor nêzîk bû, Îsa ji
wî pirsî 41 û got: Ma tu çi dixwazî
ku, ez ji te re bikim? Wî got: Ya
Xudan, bila çavên min bibînin!
42 Îsa jî ji wî re got: Bila çavên te
bibînin, baweriya te, tu xelas kirî!
43 Û wî hema dît, li pey Îsa çû û
pesnê Xwedê da û hemûyên ku vê
yekê dîtin, rûmet dan Xwedê.

*Serokê Bacgiran Zexayo*

19 Û Îsa kete Erîhayê û tê re
derbas dibû. 2 Û a vay,
zilamek li wir hebû, navê wî
Zexayo bû; ew serokê bacgiran
bû û dewlemend bû. 3 Wî dixwest
ku Îsa bibîne, ka ew kî ye û ji ber
ajawê nikarîbû, ji ber ku bejna wî
kin bû. 4 Wê çaxê, di pêşiya wan
de beziya, çû ser dareke hêjîra
bejik ku, Îsa bibîne; ji ber ku ew
ê di wê rêyê de derbas bibûya. 5 Û
gava Îsa hat wê derê, li jor nihêrt
û jê re got: Zexayo, bilezîne,
were xwar! Ji ber ku divê îro ez
li mala te bimînim! 6 Wî lez kir,
hat xwarê û bi şahî Îsa anî mala
xwe. 7 Gava ku wan ev yek dîtin,
hemûyan kirin pitepit û gotin:
Ew li cem mirovekî gunehkar bû
mêvan! 8 Lê belê Zexayo li pêş
hemûyan rawesta û ji Xudan re
got: Ya Xudan, a vay, ez nîvê malê
xwe didim belengazan û ger min ji
kesekî bi neheqî tiştek stendibe, ez
çar qat bi şun de lê vedigerinîm!
9 Îsa jê re got: Îro rizgarî gihaştiye
vê malê, ji ber ku ew jî lawek ji
yên Birahîm e; 10 ji ber, Lawê
Mirov hatiye ku, li yê windabûyî
bigere û wî xelas bike.

*Wekoka xulamên qenc û xerab*

Met 25,14-30

11 Gava wan guh didan van
tiştan, Îsa wekokekî din got, ji
ber ku nêzîkî Orşelîmê bû û wan

texmîn dikirin ku, dê Serweriya
Xwedê hema xuya bike. 12 Ji ber
vê yekê Îsa got: Zilamekî bi esil
çû welatekî dûr ku, qiraltiyekê
bistîne û dîsa vegere. 13 Wî bangî
deh xulamên xwe kir, deh mina[1]
da wan û got: Heta ku ez vegerim,
bi vana bazirganiyê[2] bikin! 14 Lê
belê welatiyên wî ji wî dikeribîn,
li pey wî şandiyan şandin û gotin:
Em naxwazin ku ev zilam li ser
me bibe qiral! 15 Û wusa bû ku,
gava wî qiraletî stend û vegeriya,
emir da ku, bangî wan xulamên
ku wî pere dabû wan bikin, bona
ew bizane ku her yekî ji wan çi bi
ser xistine. 16 Yê pêşî hat ber wî û
got: Efendî, mina te deh minayên
din bi ser xistine! 17 Wî ji xulam re
got: Aferîn xulamê qenc! Ji ber ku
tu di ya hindik de ewledar bûyî, li
ser deh bajaran bibe serwer! 18 Yê
duwemîn hat û got: Efendî, mina
te pênc mina bi ser xistine! 19 Û ji
wî re jî got: Tu jî li ser pênc bajarî
bibe serwer! 20 Yekî din hat û got:
Efendî, a vay mina te, min ew di
nav destmalekê de pêçayî hilaniye!
21 Lewma ez ji te tirsiyam, ji ber
ku tu mirovekî tund î; tiştê ku te
nedanî, tu radihêjî û tiştê ku te
neçandî, tu didirûyî. 22 Efendî ji
wî re got: Ya xulamê xerab; ez ê
te bi devê te daraz bikim! Madem
ku te dizanîbû, ez zilamekî hişk
im, tiştê min nedanî, ez radihêjim,
tiştê min neçandî, ez didirûm,
23 wê demê çima te perê min neda
serafan? Çaxê ez vegeriyam, min
ê ew bi fayiza wan ve stendibana.
24 Û ji yên ku li wê derê bûn re
got: Mina ji wî bistînin û bidin
wî yê ku deh minayên wî hene!
25 Û wan ji wî re gotin: Ya
efendî, deh minayên wî hene!
26 Ji ber ku ez ji we re dibêjim: Yê
ku ya wî hebe, dê jê re bê dayîn û
yê ku ya wî tune be, tiştê di destê
wî de jî, dê ji wî bête stendin.
27 Lê belê wan neyarên min,
yên ku ne dixwestin ez li ser wan
bibim qiral, bînin vê derê û wan li
ber min bikujin!

*Îsa Mesîh diçe Orşelîmê*

Met 21,1-11; Marq 11,1-11;
Yû 12,12-19; Zek 9,9

28 Piştî Îsa van gotinan got, derket
ser rê ku here Orşelîmê. 29 Û wusa
bû ku, gava ew nêzîkî Beytfacê û
Beytanyayê, li qeraxa wî çiyayê
ku jê re digotin Çiyayê Zeytûnê
dibû, wî du şagirtên xwe şand
30 û ji wan re got: Herin wî gundê
pêşberî we û gava hûn bikevin nav
gund, hûn ê dehşikeke girêdayî
bibînin ku hîn tu kes lê siwar
nebûye; wê vekin û bînin vir! 31 Û
ger kesek ji we bipirse: Çima hûn
vê dehşikê vedikin? Hûn ê ûsa ji

[1] Li rasteka menan binêrin.

2 Tîcaret.

wî re bibêjin: Hewcedariya Xudan
ji wê ve heye! 32 Yên ku hatine
şandin çûn û her tiştî, mîna gotina
wî dîtin. 33 Gava wan dehşik
vedikirin, xwediyên dehşikê ji wan
re got: Çima hûn dehşikê vedikin?
34 Wan jî gotin: Hewcedariya
Xudan ji wê ve heye! 35 Dehşikê
anîn cem Îsa û wan kincên xwe
danîn ser dehşikê û Îsa li wê siwar
kirin. 36 Gava ew diçû, gel ji wî
re kincên xwe li ser rê radixistin.
37 Êdî gava ew nêzîkî serjêra
Çiyayê Zeytûnê dibû, ajaweya
şagirtên wî dest pê kir û bi dilxweşî
û bi dengekî bilind pesnê Xwedê
li ser wan hemû karên mezin, yên
ku wan dîtibûn, didan 38 û digotin:
Qiralê ku bi navê Xudan tê, bila
pîroz be! Bila li ezman aşitî û li
bilindahiyan rûmet bibe! 39 Û
hinek ji Fêrisiyan yên ku di nav
ajaweyê de bûn, ji Îsa re gotin: Ya
Mamoste, dengê xwe li şagirtên
xwe hilde! 40 Û wî bersiv da û ji
wan re got: Ez ji we re dibêjim: Ger
ew bêdeng bimînin, dê kevir dengê
xwe hildin!

*Îsa bona Orşelîmê digirî*

Met 23,37-39; Lûq 13,34-35

41 Û gava Îsa nêzîk bû, bajar dît û
li ser wî giriya 42 û got: Xwezîka
te îro di vê roja xwe de ew tişt
zanîbana, yên ku ji bo dilxweşiya
te ne! Lê belê niha ew ji ber çavên
te hatine veşartin. 43 Ji ber, rojên
dê bi ser te de bên ku, neyarên
te dê li dora te çeperan çêkin û
hawirdora te bigirin, ji her alî ve
te bidin tengahiyê 44 û dê te û
zarokên te yên di nav te de li erdê
bixin û ew ê di nav te de kevirek
li ser kevirekî nehêlin, ji ber ku te
wextê serdana xwe nas nekir!

*Îsa Perestgehê paqij dike*

Met 21,12-17; Marq 11,15-19; Yû 2,13-22

45 Îsa kete Perestgehê dest pê kir,
yên ku tê de kirîn û firotinê diki-
rin, avêt derve 46 û ji wan re got:
Hatiye nivîsandin: Mala min dê
bibe mala duayê[1], lê belê we wê
kirine şkefta[2] rêbiran!
47 Îsa her roj di Perestgehê de hîn
dikir. Lê belê serokên kahînan û
alimên zagonê û mezinên netewê
lê digeriyan ku, wî bikujin, 48 lê
belê wan nikarîbûn tiştekî bibînin
ku bi wî bikin, ji ber ku hemûya
gel ji dil guh didan wî.

*Rayedariya Îsa*

Met 21,23-27; Marq 11,27-33

20 Û wusa bû ku, rojek ji ro-
jan, gava wî di Perestgehê
de hînî gel dikir û waz a Mizgîni-
yê dida, serokên kahînan, alimên
zagonê û kalepîran tev de bi ser
de hatin 2 û ji wî re gotin: Ji me

1 Îşaya 56:7
2 Yêremya 7:11

re bibêje, tu van tiştan bi çi raye-
dariyê ve dikî? An jî yê ku vê ra-
yedariyê daye te kî ye? 3 Îsa ber-
siv da wan û ji wan re got: Ez jî
tiştekî ji we bipirsim, ka ji min re
bêjin: 4 Vaftîza Yehya ji ezmanan
bû, an ji mirovan bû? 5 Ew bi hev
û din re şêwirîn û gotin: Ger em
bêjin: Ji ezmanan e, ew ê bibêje:
Çima we ji wî bawer nekirin? 6 Û
ger em bêjin: Ji mirovan e, tevahi-
ya gel dê me bidine ber keviran, ji
ber ku wan qenc bawer kirine ku
Yehya peyxamber e! 7 Û wan ber-
siv dan: Em nizanin ji ku derê ye.
8 Îsa ji wan re got: Ez jî ji we re
nabêjim ku ez van tiştan bi kîjan
rayedariyê ve dikim.

*Wekoka rez û rezvanan*

Met 21,33-46; Marq 12,1-12

9 Îsa dest pê kir û ji gel re vê
wekokê got: Mirovekî rezek
çand, ew bi kirê da rezvanan û
ji bo wextekî dirêj çû welatekî
din. 10 Û di demsala rez de wî
xulamek şand cem rezvanan ku,
ji berê rez bidine wî. Lê belê
rezvanan li wî xistin û destva-
la şandin. 11 Û wî xulamekî din
şand, wan li wî jî xistin û riswa
kirin û destvala şandin. 12 Yê si-
siyan jî şand, ew jî birîndar kirin
û avêtin derve. 13 Xwediyê rez jî
got: Gelo ez çi bikim? Ez ê lawê
xwe yî delal bişînim; dibe ku ew
ji wî şerm bikin! 14 Lê belê dema
ku rezvanan wî dîtin, bi hev û din
re şêwirîn û gotin: Ev mêrasker
e! De werin, em wî bikujin ku,
mêras ji me re bimîne! 15 Û wî
avêtin derveyî rez û kuştin. Ma
îcar dê xwediyê rez çi bi wan
bike? 16 Ew ê bê, van rezvanan
helaq bike û dê rez bide hinekên
din. Gava wan ev yek bihîstin,
gotin: Xwedê neke!
17 Lê belê Îsa li wan nihêrt û got:
Wê çaxê, vêya hatiye nivîsandin
çî ye? Ew kevirê ku hosteyan red
kirin, bû kevirê serê quncikê[1]!
18 Her kesê ku bi ser wî kevirî
de bikeve, dê ew wî perçe bike û
ew bi ser kî de bikeve, dê wî mîna
tozê hûr bike!
19 Alimên zagonê û serokên kahîn-
an xwestin ku di wê gavê de dest
bavêjin wî, ji ber wan fêhm kirin
ku Îsa vê wekoka, li ser wan anî zi-
man, lê belê ew ji gel tirsiyan.

*Pirsa dan û nedana xerca Qeyser*

Met 22,15-22; Marq 12,13-17

20 Û çavên wan lê bû ku, ji bo
ew wî bi gotina wî têxin kemînê;
zilamên ku di dîtinê de xwe rast
xuya dikin, sîxur[2] şandin cem wî
ku, wî bigirin û bidin rayedarî û da-
razkirina walî. 21 Wan ji wî pirsîn
û gotin: Ya Mamoste, em dizanin

[1] Zebûr 118:22

[2] Casûs.

ku tu ya rast dibêjî û didî hînki-
rinê, tu qet rûmetiyê ji tu kesî re
nakî, lê belê tu rêya Xwedê bi rastî
hîn dikî. 22 Îcar, ma ji me re caiz
e ku em bacê bidin Qeyser, an na?
23 Lê belê Îsa bi fenekiyên wan
hesiya û ji wan re got: Çima hûn
min diceribînin? 24 Ka dînarekî
nîşanî min bidin! Ma ew sûret û
nivîsîna li ser yên kî ne? Wan got:
Yên Qeyser in. 25 Îsa jî ji wan re
got: Madem ku ûsa ye, tiştên Qey-
ser, bidin Qeyser û tiştên Xwedê,
bidin Xwedê! 26 Wan nikarîbûn
wî ji pêş gel ve bi gotina wî têxin
kemînê; ji bersiva wî ecêb man û
devê xwe girtin.

*Pirsa li ser vejîna miriyan*

Met 22,23-33; Marq 12,18-27

27 Hinek ji Sadûqiyên[1] ku digotin,
qiyamet tune, hatin ji wî pirsîn û
gotin: 28 Ya Mamoste, Mûsa ji me
re nivîsandiye[2]: Ger birayê zilamekî
zewicî bimire û ew bê zarok be, bila
birayê wî, pîreka wî bistîne û zuri-
yetê ji birayê xwe re rake. 29 Niha
heft bira hebûn. Yê pêşî pîrek anî û
bê zarok mir. 30 Yê duwemîn jî ew
pîrek stend û bê zarok mir. 31 Û yê
sêwemîn jî ew pîrek stend û bi vî
awayî her heftan zarok li pey xwe
nehiştin û mirin. 32 Pişt re pîrek jî
mir. 33 Ma wê çaxê di roja qiya-
metê de, dê pîrek bibe pîreka kîjanî
ji wan? Ji ber ku her heftan jî wê
stendibûn.
34 Îsa jî ji wan re got: Zarokên
vê dinê jinan tînin û mêran dikin,
35 lê belê ewên ku liyaqî gîhan-
dina dinya din û vejîna miriyan
bibin, ne jinan tînin û ne jî mêran
dikin; 36 ji ber ku ew careke din
nikarin bimirin, ji ber ew mîna
milyaketan in; ew zarokên Xwedê
ne, ji ber ku ew zarokên vejînê ne.
37 Lê belê Mûsa jî di birra Deviyê
de, bi gotina: Xwedayê Birahîm û
Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûp[3],
bangî Xudan kir û ji nû ve rabûna
miriyan da xuyakirin. 38 Ew ne
Xwedayê miriyan, lê belê yê zin-
diyan e; ji ber ku hemû bona wî di-
jîn. 39 Û hinekan ji alimên zagonê
bersiv dan û gotin: Ya Mamoste, te
qenc got! 40 Ji ber ku êdî wan qet
nediwêrîn ku tiştekî ji wî bipirsin.

*Mesîh Lawê kî ye?*

Met 22,41-46; 23,1-36; Marq 12,35-40

41 Îsa ji wan re got: Çawa dibêjin
ku Mesîh Lawê Dawid e? 42 Ji
ber ku Dawid di pirtûka Zebûrê
de dibêje: Xudan ji Xudanê min
re got: Heta ku ez neyarên te 43 ji
lingên te re pêlik deynim, li rastê
min rûnê[4]! 44 Nuha, ger Dawid,
bi gotina Xudan bangî wî bike,

1 Di Cihûyan de firqekî olê ye.
2 (5.Mûsa 25:5)
3 (2.Mûsa 3:6)
4 Zebûr 110:1

ew dê çawa bibe lawê wî? 45 Û
gava hemûya gel guh didanê, wî ji
şagirtên xwe re got: 46 Bila hayê
we ji alimên zagonê ve hebe, yên
ku dixwazin bi qeftanên dirêj bi-
gerin û hez dikin ku di sûkan de
gel silavê bidin wan û di keniştan
de li ser kursiyên pêşî rûnin û
cîhên pêşî li ser ziyafetan bigirin;
47 ew malên jinebiyan dadiqur-
tînin û ji bo ku bên dîtin, duayên
xwe dirêj dikin; dê vana bikevin
bin daraziya hîn jî mezintir!

*Xelata jinebiyê*
Marq 12,41-44

21 Dema Îsa çavê xwe rakir û
nihêrt, dewlemendên ku di-
yariyên xwe davêjin xezîneyê dît.
2 Lê belê wî jinebiyek belengaz
ya pûlikî[1] davêje wir jî dît. 3 Û Îsa
got: Ez bi rastî ji we re dibêjim: Vê
jinebiya belengaz ji wan hemûyan
bêtir avête nav! 4 Ji ber ku vana
hemûyan ji tiştên ku ji wan zêde
bûn, avêtin nav diyariyan, lê belê
vê pîrekê ji xizaniya xwe rizqê
xwe hemû avête nav.

*Dê kevir li ser kevir nemîne*
Met 24,1-2; Marq 13,1-2

5 Û gava ku hinekan gotin, Pe-
restgeh bi kevirên sipehî û bi
diyariyan hatiye xemilandin,
Îsa got: 6 Heçî ev tiştên ku hûn
dibînin, dê roj bên ku hingê li vê
derê kevir li ser kevir namîne ku
nayê hilweşandin!

*Li ser xapandin û tengasiyên mezin*
Met 24,3-14; Marq 13, 5-13

7 Wan jî ji Îsa pirsiyan û gotin: Ya
Mamoste, ma îcar ev tiştê hanê dê
kengê biqewimin û çaxê ev tiştan li
ber qewimandinê bin, nîşana wan
çî ye? 8 Îsa jî got: Hay ji xwe he-
bin ku hûn neyên xapandin! Ji ber
ku gellekan dê bi gotinên: Ez ew
im! Û: Wext nêzîk bûye! bi navê
min ve werin; li pey wan neçin!
9 Gava hûn bibihîzin ku qala şer û
binavhevketinan bê kirin, metirsin,
ji ber hewce ye ku pêşiyê vana bi-
qewimin, lê belê hema dawî nayê.
10 Wê gavê ji wan re got: Dê netew
li dijî netewê û qiraletî li dijî qira-
letiyê serî hilde 11 û dê zelzeleyên
mezin û li cîh cîhan xela û jana zirav
çêbibin û tiştên tirsehêz û nîşanên
mezin dê li ezmanan bibin. 12 Lê
belê ji berî van hemû tiştan dê dest
bavêjin we û ew ê ji ber navê min
we bidin destê kenişt û hepsan, dê
we bibin ber qiral û waliyan û dê
we bidin tengasiyê. 13 Ev tişt dê
biqewimin ku hûn şahdeyiyê bona
min bikin. 14 Ji ber vê yekê, ji pêşî
ve bixin dilên xwe ku hûn nefiki-
rin, hûn ê çi bersivê bidin; 15 ji ber
ku ez ê dev û ziman û zanyariyê
bidim we ku neyarên we nikaribin
li ber we biaxifin an jî bisekinin.

[1] Sifir, paxir.

16 Lê belê hûn, hûn ê heta ji aliyê
dayik û bav, bira, meriv û hevalan
ve, bi dest ve bêne dayîn û dê ji
we hinekan bikujin. 17 Ji ber navê
min her kes jî dê ji we bikerihin.
18 Û mûyek ji serê we winda nabe.
19 Hûn ê bi sebra xwe canên xwe
bi dest xwe bixin!

*Xerabûna Orşelîmê têgihandin*

Dan 9,26; Met 24,5-21; Marq 13,14-19

20 Lê belê gava hûn bibînin ku
hawirdora Orşelîmê bi leşkeran
tê girtin, bizanin ku xerabûna
wê nêzîk e. 21 Wê demê, yên ku
di Cihûstanê de ne, bila birevin
çiyan! Û yên ku di bajêr de ne,
bila jê derkevin! Û yên ku li çolê
ne, bila nekevin hundirê bajêr!
22 Ji ber ku ev ew rojên tolhildanê
ne, da ku heçî tiştên hatine
nivîsandin, bên cîhên xwe. 23 Wey
li serê wan, yên ku di wan rojan
de ducanî û bişîr in! Ji ber ku dê
tengasiyek mezin were ser welêt
û xezeb bê ser vî qewmî. 24 Ew ê
bikevin ber devê şûr, bi dîlî dê bên
birin nav hemû neteweyan û heta
dema neteweyan biqede, dê Orşe-
lîm di bin lingên wan de biperçiqe.

*Hatina Lawê Mirov*

Met 24,29-31; Marq 13,24-27

25 Li ser roj, heyv û stêrkan dê
nîşan çêbibin û li ser erdê ji ber
xuşîn û mişîna pêlên behrê, dê
gel bibizdin û şaş bibin. 26 Ew
mirovên li hêviya wan tiştên ku
bên serê dinê disekinin, ji tirsan
dê dilê wan bibihûre; ji ber
ku hêzên ezmanan dê bihejin.
27 Û wê gavê dê bibînin ku
Lawê Mirov, bi qudret û bilin-
dahiya mezin ji ewrekî tê. 28 Lê
belê dema van bûyeran dest pê
bikin, li jor binihêrin û serê xwe
bilind bikin[1]; ji ber ku xelasiya
we nêzîk bûye.
29 Û Îsa wekokekê ji wan re got:
Li dara hêjîrê û li hemû darên din
binihêrin! 30 Gava ew bipişkivin,
hûn dibînin û hûn ji ber xwe di-
zanin ku êdî havîn nêzîk e. 31 Bi
vî awayî, çaxê hûn jî bibînin ku
ev tiştên hanê diqewimin, biza-
nin ku Serweriya Xwedê nêzîk e.
32 Bi rastî ez ji we re dibêjim: Ev
nifş nabihûre, heta ev tiştên hanê
hemû neyên cîhê xwe. 33 Erd û
ezman dê bibihûrin, lê belê go-
tinên min nabihûrin.

*Li xwe miqate bin*

Met 24,36-51; Marq 13,32-37;
Rom 13,11-14; 1.Sel 5,4-8

34 Lê belê li xwe miqate bibin ku,
bi xwarina zahfî û serxweşîtiyê û
bi xemên vê jiyanê dilê we giran
nebe û ew roj ji nişka ve wek da-
fikekê bi ser we de neyê! 35 Ji ber
ku dê ew bi ser wan hemûyên ku
li ser rûyê erdê dimînin de were.

1 An jî: Serê xwe rakin.

36 Lê belê her gav dua bikin û
hişyar bimînin, ji bo ku hûn bika-
rin, ji ber van hemû tiştên ku dê
biqewimin, birevin û li ber Lawê
Mirov rawestin!
37 Û Îsa bi roj di Perestgehê de
dida hînkirinê û bi şev derdiket,
diçû wî çiyayê ku jê re Çiyayê
Zeytûnê tê gotin, şeva xwe di-
buhurand. 38 Û hemûya gel sibê
zû dihatin nav Perestgehê cem wî
ku, guhdariya wî bikin.

*Xaçkirin û vejîna Îsa Mesih*
*Dek û dolabên ku bona kuştina Îsa tên avakirin*
Met 26,1-5; 26,14-16;
Marq 14,1-2; 14,10-11; Yû 11,45-53

22 Cejna Nanê Bêhavên, ya
ku jê re Fisih tête gotin,
nêzîk dibû. 2 Serokên kahînan û
alimên zagonê lêkolînê dikirin ka
çawa rêyekê bona kuştina Îsa bi-
bînin; ji ber ku, ji gel ditirsiyan.
3 Û Îblîs ket Cihûdayê[1] ku, ji
Donzdehan bû û jê re yê Îsxer-
yotî dihat gotin. 4 Û ew rabû, çû
cem serokên kahînan û ferman-
daran, ew bi wan re kete axaf-
tinê, ka dê ew çawa Îsa bide des-
tê wan. 5 Ew şa bûn û bi wî re li
hev hatin ku, ew pere bidin wî.
6 Ew jî razî hat û li keysekê di-
geriya ku, bêyî civaka ajawe wî
bide destê wan.

*Xwarina Fisihê ya bi Şagirtan re*
Met 26,17-20; Marq 14,12-17;
Yû 13,21-30

7 Roja Nanê Bêhavên, ya ku hewca
jêkirina berxê goriya Fisihê dike,
hat. 8 Îsa Pêtrûs û Yûhena şand û
ji wan re got: Herin, şîva Fisihê, ji
me re amade bikin ku em bixwin!
9 Wan jî gotin: Ma tu dixwazî, em
wê li ku derê amade bikin? 10 Îsa
jî ji wan re got: A vay, gava hûn
bikevin bajêr, dê zilamekî ku bi
cerê ve avê dikişîne rastî we were;
hûn jî li pey wî bikevin xaniyê ku
ew ê bikevê 11 û ji xwediyê malê
re bêjin: Mamoste ji te dipirse: Ka
ew odeya ku ez ê tê de, bi şagirtên
xwe re şîva Fisihê bixwim, li ku
derê ye? 12 Û ew ê li qata jor
odekê mezin ya raxistî nîşanî
we bide; li wê derê amade bikin!
13 Ew çûn, wan her tiştî mîna ku
Îsa ji wan re gotiye, dîtin û Fisihê
amade kirin.

*Sifra ku Îsa ava kir:*
*Nan û xemra wekokî*
Met 26,26-30; Marq 14,22-26;
1.Kor 11,23-25

14 Û gava dema xwarinê hat,
Îsa bi şandiyan re, li sifrê rûnişt
15 û ji wan re got: Hîn ji berî ku
ez eziyetê bikişînim, dilê min pirr
xwest ku ez bi we re vê Fisihê
bixwim. 16 Ji ber ku ez ji we re
dibêjim: Heta ku di Serweriya
Xwedê de pêk neyê, ez ê dîsa ji

[1] An jî: Îblîs ket dilê Cihûda...

vê nexwim[1]. 17 Û wî kasekê[2]
rahişt, şikir kir û got: Vêya bigi-
rin û di nava xwe de par bikin!
18 Ji ber ku, ez ji we re dibêjim:
Heta Serweriya Xwedê neyê,
ez êdî ji zadê mêwê venaxwim.
19 Û wî rahişt nan, şikir kir,
şikand; da wan û got: Ev bedena
min e, ya ku di ber we de dê bête
dayîn; vêya ji bo bîranîna min
bikin! 20 Paşî xwarinê, bi gotina:
Ev kase, Peymana nû ya ku bi
xwîna min ya bona we dirije ye,
bi eynî awayî kasê jî da wan.
21 Lê belê a vay, destê wî kesê
ku min bide dest, bi min re, li ser
sifrê ye. 22 Ji ber, Lawê Mirov,
mîna ku biryar hatiye dayîn diçe;
lê belê wey li wî kesê ku, bi nav-
gîniya wî bi dest ve bête dayîn!
23 Û hemû şagirtan dest pê kir û
ji hev pirsîn, kesê vî karî bike, ji
nava wan ka kî ye?

*Yê mezintir kî ye?*

Met 20,20-28; Marq 10,35-45; Yû 13,2-17

24 Keftûleftî kete nav wan, ka kî
ji nav wan yê mezintir e. 25 Îsa
ji wan re got: Qiralên neteweyan
rayedariyê li ser wan dikin û yên
ku zordariyê li wan dikin, dihêlin
ku ji wan re qencîxwaz bê gotin.
26 Hûn ê ûsa nebin; lê belê bila
yê herî mezin di nav we de wek
yê herî biçûk û yê serok wek yê
xulam be. 27 Ji ber ku, ma yê me-
zintir kî ye? Gelo yê li sifrê rûdi-
ne, an yê xizmetê dike? Ma ne yê
li sifrê rûdine, mezintir e? Lê belê
heçî ez im, ez di nav we de wek
xizmetkarekî me.
28 Lê belê yên ku di ceribandinên
min buhirandine de, tevî min xwe
ragirtine hûn in. 29 Û mîna ku
Bavê min serweriyê daye min,
ez ê jî di serweriya xwe de bona
ku hûn bixwin û vexwin 30 û ser-
weriyê li donzdeh nîjadê Îsraêlê
bikin û li ser textan rûnin, serwe-
riyekê bidim we.

*Îsa ji pêşiyê dide xuyakirin ku dê Pêtrûs wî înkar bike*

Met 26,31-35; Marq 14,27-31;
Yû 13,36-38

31 Şîmûn, ha Şîmûn! A vay, Îblîs
xwest ku we mîna genim li bêjingê
bixe; 32 lê belê min ji bo te dua
kir ku, ji bo baweriya te neçike[3] û
çaxê tu dîsa vegerî, dilê birayên
xwe xurt bike! 33 Lê belê wî ji Îsa
re got: Ya Xudan, ez amade me ku
bi te re him herim girtîgehê û him
jî mirinê! 34 Îsa got: Pêtrûs, ez ji te
re dibêjim: Heta ku tu sê carî min
înkar nekî, dê îro dîk neure[4]!
35 Û Îsa ji wan re got: Dema min
we bê xelîtk, tûr û pêlav[5] şandin,

1 An jî: Heta ku di Serweriya Xwedê de temam nebe, dê ez ê dîsa ji vê nexwim.
2 Tas, kasik.
3 Neqede.
4 Bang neke, an jî: Bang nede.
5 Sol, çarox.

ma hewcedariya we ji tiştekî re
bû? Wan gotin: Na, hewcedariya
me ji tu tiştî re nebû! 36 Îsa ji wan
re got: Lê belê bila niha, ew ê ku
xelîtka wî hebe, bila wê hilgire, yê
ku tûrê wî hebe jî, bila wî hilgire û
ew ê ku bê şûr be, bila kincên xwe
bifiroşe û ji xwe re şûrekî bikire.
37 Ji ber ku, ez ji we re dibêjim:
Hewce dike ku ev ya bi gotina: Û
ew bi gunehkaran re yek hate he-
sibandin[1], hatiye nivîsîn di min de
biçe serî; ji ber, hewce dike ku go-
tina di derheqê min de were cîh[2]!
38 Wan gotin: Ya Xudan, a vay,
du şûr li vir hene! Wî jî ji wan re
got: Êdî bes e!

*Îsa li ser Çiyayê Zeytûnê dua dike*

Met 26,36-46; Marq 14,32-42

39 Û ew derket û mîna adeta xwe
çû Çiyayê Zeytûnê, şagirtên wî jî li
pey wî çûn. 40 Gava Îsa gîhaşt wê
derê, wî ji wan re got: Dua bikin
ku, hûn nekevin ceribandinê! 41 Û
pişt re bi dûrbûna avêtina kevirekî
ji wan dûr ket, çû ser çokan, dua kir
42 û got: Ya Bavo, ger tu bixwazî,
vê kaseyê ji min derbas bike; lê belê
dîsa jî bila daxwaza te be, ne ya
min! 43 Di vê gavê de milyaketek
jê re ji ezmanan xuya bû û quwet da
wî. 44 Û dema ew di berxwedanek
dijwar de bû, bi germiyek hîn jî
zêdetir dua kir; xwêdana wî wek
dilopên xwînê yên gir ku dikevin
ser erdê bû. 45 Dema ew ji duê
rabû, li şagirtên xwe vegeriya û
dît ku ew ji keserê di xew de çûne.
46 Wî ji wan re got: Çima hûn di
xew de diçin? Rabin û dua bikin
ku, hûn nekevin ceribandinê!

*Destdan û girtina Îsa*

Met 26,47-56; Marq 14,43-50; Yû 18,3-12

47 Îsa hîn di axaftinê de bû, a
vay, ajaweyek û di pêşiya wan de
Cihûda, yê ku yek ji Donzdehan
bû, bi ser wan de hat û Cihûda ber
bi Îsa ve hat ku wî ramûse. 48 Lê
belê Îsa ji wî re got: Cihûda, ma
tuyê bi ramûsanekê Lawê Mirov
bide dest? 49 Gava wan, yên li
dora wî bûn dîtin, ka dê çi bibe,
wan gotin: Ya Xudan, ma em bi
şûr lêxin? 50 Û yekî ji wan li xu-
lamê Serokkahîn xist û guhê wî
yê rastê jê xist. 51 Lê belê Îsa
bersiv da û got: Bes e, ewqas! Wî
destê xwe danî ser guhê xulam û
wî baş kir.
52 Îsa ji serokên kahînan, ser-
werên Perestgehê û kalepîrên ku
bi ser wî ve hatine re got: Ma hûn
ûsa bi şûr û daran wekî ku li dijî
rêbirekî be hatine? 53 Gava ez her
roj di Perestgehê de di nav we de
bûm, rojekê we destê xwe li min
ranekirin; lê belê ev saeta we ye û
qudreta tariyê ye!

[1] Mîna gunehkaran hate hesibandin. Îşaya 53:12

[2] Biçe serî.

*Pêtrûs Îsa înkar dike*

Met 26,57-58, 69-75; Marq 14,53-54, 66-72; Yû 18,12-18, 25-27

54 Îsa girtin û anîn mala Serokkahîn. Pêtrûs jî ji dûr ve li pey wî diçû. 55 Gava di hewşa xanî de agir dadan û li dorê rûniştin, Pêtrûs di nav wan de rûnişt. 56 Û pîrekeke berdestî jî ew li ber êgir dît, wê çav lê zûr kir û got: Ev zilam jî bi wî re bû! 57 Lê belê Pêtrûs înkar kir û got: Ya pîrekê, ez wî nas nakim! 58 Paşê demekê din, yekî din ew dît û got: Tu jî yek ji wan î! Lê belê Pêtrûs got: Na, ya mirovo, ez ne ji wan im! 59 Gava nêzîkî saetekê di wê navê de derbas bû, yekî din jî rabû û ji dil got: Bi rastî ev zilam jî bi wî re bû, ji ber ku ew ji Celîlê ye! 60 Lê belê Pêtrûs got: Ya zilamo, ez fêhm nakim, ka tu çi dibêjî! Hîn ew diaxifî, dîk uriya[1]. 61 Û Xudan zivirî, li Pêtrûs nihêrt û gotina Xudan hate bîra Pêtrûs, çawa ku ji wî re gotibû: Îro berî ku dîk biure, tuyê sê carî min înkar bikî! 62 Û Pêtrûs derket derve û bi êş û jan giriya.

*Îsa li ber Civata Netewî*

Met 26,67-68; 27,1; Marq 14,53-65; 15,1; Yû 18,19-24

63 Zilamên ku bi Îsa girtibûn, qerfên xwe bi wî kirin û lêxistin. 64 Wan çavên wî girêdan, ji wî pirsîn û gotin: De ka peyxambertiyê bike, yê ku li te xist kî ye? 65 Û wan hîn jî bêtir ji wî re kufr kirin.

66 Gava bû roj, kalepîrên gel, serokên kahînan û alimên zagonê li hev civiyan û wî anîn Civata Netewî û gotin: 67 Ger tu Mesîh î, ji me re bibêje! Lê belê Îsa ji wan re got: Ger ez ji we re bibêjim, hûn bawer nakin 68 û ger ez ji we bipirsim, hûn bersiva min nadin. 69 Lê belê ji niha pê ve Lawê Mirov dê li aliyê rast yê qudreta Xwedê ve rûniştî be. 70 Û hemûyan bi hev re ji wî pirsîn: Ma wê demê, tu Lawê Xwedê yî? Wî jî ji wan re got: Hûn bi xwe dibêjin ku ez ew im! 71 Wan jî got: Ma êdî çi hewcedariya me bi şahdeyan re heye? Ji ber ku me bi xwe ji devê wî bihîst!

*Îsa li ber Walî Pîlato*

Met 27,1-2; 11-14; Marq 15,1-5; Yû 18,28-38

23 Û tevahiya civakê rabû ser xwe û wî birin ber Pîlato. 2 Û dest bi giliyê wî kirin û gotin: Me dîtin ku, çawa vî zilamî gelê me ji rê derdixist, ne dihişt ku baca Qeyser bê dayîn û ji xwe re dibêje ku ew Mesîh, Qiral e. 3 Pîlato ji wî pirsî û got: Ma tu Qiralê Cihûdan î? Îsa bersiv da wî û got: Mîna ku tu dibêje yî! 4 Pîlato

1 Dîk bang da.

ji serokên kahînan re û ji ajaweya
gel re got: Ez tu sûcên vî mirovî
nabînim! 5 Lê belê ew li ser ya
xwe man û gotin: Vî mirovî gel di
seranserê Cihûstanê hemûyî de, ji
Celîlê û heta vir bi hînkirina xwe
rakiriye ser piyan!

*Îsa dişînin cem Hêrodês*

6 Gava Pîlato ev bihîst, wî pirsî
û got: Ma ev mirov ji Celîlê ye?
7 Û gava hîn bû ku ew ji wê dera
ku di bin destê Hêrodês de ye,
wî ew şand cem Hêrodês; Hêro-
dês bi xwe jî di van rojan de li
Orşelîmê bû. 8 Lê belê gava
Hêrodês Îsa dît, ew gellekî şaş
bû, ji ber ku hîn ji zû ve wî di-
xwest ku wî bibîne; ji ber ku wî
pirr tişt di derheqê wî de bihîs-
tibû û hêvî dikir ku, ew li ber
wî ve kerametekê bike. 9 Wî jî
gellek pirs li ber Îsa danî, lê belê
Îsa tu bersivî neda wî. 10 Se-
rokên kahînan û alimên zagonê
li ser piyan rawestan û giliyên
xwe li ser wî kirin. 11 Hêrodês
û leşkerên wî, wan hemûyan ew
bêqedir kirin û qerfên xwe bi wî
kirin; wan kinceke spehî yê biçi-
rawîsk lê kirin û dîsa wî vege-
randin cem Pîlato. 12 Di wê rojê
de Pîlato û Hêrodês bûn hevalê
hev[1]; ji ber ku berî vêya neyartî
di nava wan de hebû.

*Daraziya kuştina Îsa*

Met 27,15-26; Marq 15,6-15;
Yû 18,39-19,16

13 Pîlato bangî serokên kahînan,
serokan û gel kir 14 û ji wan re
got: We vî mirovî, wekî yekî ku
gel ji rê ve derdixîne ji min re anîn
û a vay, min li ber we wî kişand
pirsiyariyê û di vî zilamî de ji
tiştên ku we gilî kirine sûcekî ne-
dît; 15 Hêrodês jî nedîtiye; ji ber
ku ûsa ye, wî ew li me vegerand û
a vay, vî mirovî tiştekî nekiriye ku
bihaya wî kuştin be. 16 Ji ber vê
yekê ez ê wî bidim ber qamçiyan
û berdim!
17 Lê belê Pîlato hewce bû ku, di
her cejnê de girtiyekî bona wan
berdana. 18 Lê belê koma aja-
weyê bi dengekî kire qêrîn û got:
Vî ji ber çavê me rake[2], Barabas
ji me re berde! 19 Ew ji bona
serîhildanekê ku li bajêr derxis-
tibû û bona mêrkuştinê avêtibûn
girtîgehê. 20 Lê belê Pîlato, ca-
reke din bi wan re axifî, ji ber wî
dixwest ku Îsa berde. 21 Lê belê
wan kirin qêrîn û gotin: Wî xaç
bike, wî xaç bike!
22 Û Pîlato cara sisiyan ji wan
re got: Ka vî mirovî çi xerabiyê
kiriye? Min tu sûcê ku bihayê wî
kuştin be, li ser wî nedîtiye; ji ber
vê yekê, ez ê wî bidim ber qamçi-
yan û berdim. 23 Lê belê dîsa ew

[1] An jî: Bi hev û din re bûn dost.

[2] An jî: Tune bike!

li ser ya xwe diman û bi qêrîneke
bilind dixwestin ku ew bê xaç-
kirin û dengê wan bi ser ve ket.
24 Pîlato biryara xwe da, ji bo
ku daxwaza wan bê cîh. 25 Wî,
zilamê ku ji ber serîhildanekê û
mêrkujiyê avêtibûn girtîgehê, yê
ku bi dilê wan bû, berda û Îsa bi
daxwaziya wan ve berda.

*Xaçkirina Îsa*

Met 27,32-44; Marq 15,21-32; Yû
19,17-27

26 Gava wan ew dibirin, wan
Şîmûnê Kûrênê, yê ku ji zeviyê
vedigeriya girtin û xaçê li pişta wî
kirin ku, ew wê li pey Îsa bibe.
27 Li pey wî jî komeke mezin ji
gel dihat, di nav wan de pîrek jî
hebûn ku li sînga xwe dixistin li
ser Îsa digiriyan. 28 Îsa li wan
zivirî û ji wan re got: Ya keçên
Orşelîmê, li ser min negirîn; lê
belê li ser xwe û zarokên xwe bi-
girîn! 29 Ji ber ku dê rojên werin
ku, mirov ji xwe re bêjin: Xwezî
bi yên ku bê ber in û bi wan reh-
mên[1] ku zarok neanîne û bi wan
memikên ku nemêjandine! 30 Ji
ber ku wê demê dê mirov dest pê
bikin û ji çiyan re bêjin: Bi ser me
de bikevin! Û ji giran re bêjin: Me
veşêrin! 31 De îcar ger mirov ûsa
bi serê dara ter dike, ma dê rewşa
dara hişk çi bibe? 32 Û du zilamên
din jî, yên ku sûcdar bûn, dibirin
ku ew jî bi wî re bên kuştin.
33 Û gava ew gîhaştin cîhê ku
ji wir re digotin Qoq, wan ew bi
herdu sûcdaran re, yek li milê wî
yî rastê û yê din jî li milê wî yî
çepê, xaç kirin. 34 Îsa got: Bavo,
li wan bibexşîne, ji ber ew nizanin
ku çi dikin! Wan jî kincên wî bi
pişkê, di nava hev de par kirin.
35 Gel li wê derê sekinîbû û temaşe
dikirin. Serokan jî qerfên xwe bi
wî dikirin û digotin: Wî kesên din
xelas kirin, ger ew Mesîhê bijarti-
yê Xwedê ye, bila xwe xelas bike!
36 Leşkeran jî qerf û henekên xwe
pê dikirin, nêzîkî wî bûn û sîrkê
jê re anîn 37 û gotin: Ger tu qi-
ralê Cihûdan î, ka xwe xelas bike!
38 Li ser wî jî bi tîpên Yewnanî,
Latînî û Îbranî ev nivîs hebû: QI-
RALÊ CIHÛDAN EV E.
39 Yekî ji wan sûcdarên daliqandî
jî, ji wî re kufr kir û got: Ma tu
ne Mesîh î? Ka xwe û me xelas
bike! 40 Lê belê yê din bersivê
da wî, pê re xeyidî û got: Çawa
ku tu jî di bin eynî daraziyê de
yî, gelo tu ji Xwedê natirsî?
41 Û bi rastî em li gor heqê, ji
ber, em cezayê ku liyaqî kirinên
me ye dikişînin; lê belê wî, tu
neheqî nekiriye! 42 Û wî ji Îsa re
got: Ya Xudan, dema tu bigehêjî
Serweriya[2] xwe, min di bîra xwe

1 Malzarokên.

2 An jî: Dema tu di Serweriya xwe de werî...

de bîne! 43 Îsa jî jê re got: Bi rastî
ez ji te re dibêjim: Tuyê îro bi min
re di cenetê[1] de bî!

*Mirina Îsa*

Met 27,45-56; Marq 15,33-41; Yû
19,28-30

44 Gava saet nêzîkî şeşan bû, rojê
tarîtî girt û tarîstanî heta bi saet
nehan kete ser 45 hemûya welêt û
perda Perestgehê ji navê ve çiriya.
46 Îsa bi dengekî bilind kir qêrîn
û got: Bavo, ez ruhê xwe dixim
nav destên te! Û piştî ku wî vêya
got, ruhê xwe da.
47 Gava serpel[2] tiştê ku qewimî
dît, wî pesnê Xwedê da û got: Bi
rastî ev mirova, mirovekî rast bû!
48 Û hemûya gel, yên ku bona vê
temaşeyê civiyabûn, gava dîtin ku
çi dibû, li sînga xwe xistin û ve-
geriyan. 49 Hemû nasên wî jî tev
wan jinên ku ji Celîlê, li pey wî
hatibûn, ji dûr ve sekinîbûn û ev
tiştên hanê temaşe dikirin.

*Binaxkirina Îsa*

Met 27,57-61; Marq 15,42-47;
Yû 19,38-42

50 Û a vay, zilamek endamê
Civata Netewî hebû, navê wî
Ûsiv bû; ew mirovekî qenc û
rast bû; 51 ev mirov bi xwestin
û kirina wan ve razî nehatibû;
ew ji Arîmetya, bajarekî Cihûdan
bû û li hêviya hatina Serweriya
Xwedê bû; 52 ew çû cem
Pîlato û cesedê Îsa ji wî xwest.
53 Gava wî ji xaçê ve daxist
xwarê, wî ew di nav cawekî de
pêça û ew xiste goreke ku di
latekê de hatibû kolan, ya ku hîn
kesek tê de nehatibû veşartin.
54 Ew roj, roja Amadekirinê bû û
roja Sebtê dest pê dikir.
55 Ew jinên ku ji Celîlê bi wî re
hatibûn, li pey çûn, wan gor û
çawa cesedê wî tê de hat danîn,
dîtin. 56 Û vegeriyan û bixûr û
rûnê bêhnxweş amade kirin. Û
roja Sebtê li gor emrê rawestiyan.

*Vejîna Îsa*

Met 28,1-10; Marq 16,1-8; Yû 20,1-10

24 Lê belê pîrekan, roja pêşî
ya heftê, hîn sibehê zû,
bixûrên ku amade kiribûn anîn û
hatin gorê. 2 Lê belê wan dîtin ku
kevirê ser gorê ji cîhê xwe gindi-
riye[3]. 3 Û gava ew çûn nava wê,
wan cesedê Xudan Îsa nedîtin. 4 Û
wusa bû ku, gava ew ji ber vê yekê
li xwe şaş diman, ji nişka ve du zi-
lamên ku şewq ji cilên wan diçû li
cem wan rawestiyan.
5 Û pîrekan çawa ku tirsiyabûn
û wecên xwe bera erdê dabûn;
zilaman ji wan re gotin: Çima

[1] Bihuşt.
[2] Sitvan.
[3] Gindirî bûye.

hûn yê zindî di nav miriyan de
digerin? 6 Ew ne li vê derê ye,
lê ew rabûye! Bînin bîra xwe, wî
çi ji we re digot, gava ku ew hîn
li Celîlê bû: 7 Divê Lawê Mirov
bidin destên gunehkaran, bê xaç-
kirin û roja sêwemîn biveje.
8 Pîrekan jî gotinên wî anîn bîra
xwe 9 û ji ser gorê vegeriyan û çûn,
ji her Yanzdehan û ji hemûyên din
re her tiştî gotin. 10 Ev in, yên ku
xeber ji şandiyan re anîn: Merye-
ma Mejdelanî û Yohana û Merye-
ma diya Aqûp û hinên dinî ku bi
wan re bûn. 11 Ev yek li ber ça-
vên şandiyan mîna çîrokeke pûç
hate xuyakirin û wan ji pîrekan re
bawer nekirin. 12 Lê belê Pêtrûs
rabû ser xwe û bi lez çû ser gorê;
gava wî xwe bi ser de xwar kir, wî
jî cawên kitanî pê ve tu tiştê din
nedît û ew bi vî tiştê bûyî ecêb ma
û çû mala xwe.

*Li ser rêya Emwasê*

Marq 16,12-13

13 Û a vay, dîsa wê rojê, du kesên
ji wan, diçûn gundê ku ji Orşelîmê
ve di dûrbûna şêst tîr avêtinê de
dûr e û jê re Emwas tête gotin.
14 Û ew di derheqê hemû van
karên ku bûyîne de pev re diaxi-
fîn. 15 Û wusa bû ku, gava ew
hîn diaxifîn û ji hev û din dipir-
siyan, Îsa bi xwe nêzîk bû û bi
wan re meşiya. 16 Lê belê çavên
wan hatibûn girtin ku ew wî nas
nekin. 17 Wî ji wan re got: Ev
gotinên ku hûn di rê de ji hev û
din re dibêjin çi ne û çima hûn
wusa xemgîn in[1]? 18 Yekî ji wan,
yê ku navê wî Klêpas bû, bersiv
da û jê re got: Ma tuyê bi tenê yî
ku, li Orşelîmê dimîne û nizane
ku li wê derê, di van rojan de çi
bûye? 19 Û wî ji wan re got: Ma
kîjan tişt? Û wan jê re gotin: Ew
tiştên ku li ser Îsayê Nisretî, yê
ku peyxamber bû û bi gotin û ki-
rinê li ber Xwedê û hemûya gel
bi qudret bû 20 û çawa serokên
kahînan û mezinên me wî dan
dest, ji bona daraziya kuştinê li
ser derkeve û wan ew xaç kir.
21 Lê belê me hêvî dikirin ku, yê
Îsraêlê xelas bike ew be. Lê belê
ji xeynî van hemûyan jî, a vay, îro
roja sêwemîn e ku ev tişt bûne!
22 Ji xeynî vêya hinek pîrekên
ji nav me jî, hîn sibehê zû li ser
gorê bûn 23 û dema wan cesedê
wî nedîtin; ew vegeriyan û ka
wan li wir çawa xewn û xeyalê
milyaketên ku gotine; ew dijî!
dîtine ji me re gotin û me şaş
û metal kirin. 24 Pişt re hinek
ji yên ku bi me re ne, çûn ser
gorê û wan jî ew tişt ûsa, mîna
ku pîrekan gotibûn, dîtin; lê belê
wan ew bi xwe nedîtin.
25 Û wî ji wan re got: Hey li we
bêhişan, yên ku bi dilgiranî bawe-

1 An jî: Wecê wan bi xemgînî bûyî sekinîn.

riyê bi wan hemû tiştên ku pey-
xamberan gotiye, tînin! 26 Ma ne
hewce bû ku, Mesîh van eziyetan
bikişîne û here nav rûmeta xwe?
27 Wî ji Mûsa û hemû peyxam-
beran dest pê kir û ji wan re her
tiştên ku li ser wî, di hemû Ni-
vîsên Pîroz de hatibûn nivîsandin,
da ronahî kirin.
28 Û dema nêzîkî wî gundê ku
ew diçûnê, bûn, wî da xuyaki-
rin, mîna ku ew ê hîn jî bi rê ve
biçe. 29 Û wan zorê dan wî û jê
re gotin: Li cem me bimîne, ji
ber ku ber bi êvarê ye û rojê xwe
berdaye xwar! Ew bi wan re çû û
derbasî hundir bû ku, li cem wan
bimîne.
30 Û wusa bû ku, gava ew bi
wan re li sifrê rûnişt, rahişt nan,
şikir kir, şikand û da wan. 31 Û
di wê demê de çavên wan vebûn
û wan wî nas kirin û ew ji ber ça-
vên wan winda bû. 32 Û wan ji
hev û din re gotin: Ma dema ew
di rê de, bi me re axifî, Nivîsên
Pîroz şîrove dikir, di hundirê me
de, dilê me nedişewitî û agir pê
nediket?
33 Û hema di wê saetê de bi xwe
herdu rabûn ser xwe û vegeriyan
Orşelîmê. Gava ew gîhaştin, wan
dît ku her Yanzdehan û yên dinî
bi wan re li hev civiyabûn 34 û
digotin: Xudan bi rastî rabûye
û xwe nîşanî Şîmûn daye! 35 Û
vana jî, ka çi bi wan re bi rê de
çêbûbû û dema wî nan şikand,
wan çawa wî nas kirine, gotin.

*Îsa xwe nîşanî Şagirtan dide*

Met 28,16-20; Marq 16,14-18;
Yû 20,19-23; K.Şa 1,6-8

36 Hîn ew ûsa diaxifîn, Îsa bi
xwe di nav wan de derket û got:
Bila aştî li we be! 37 Lê belê
bêzarî bi wan ve ket û zehf tirsi-
yan û gotin qey ruhekî dibînin.
38 Û wî ji wan re got: Ma çima
hûn ecêb dimînin û çima di dilê
we de şik dizên? 39 Li dest û
lingên min binihêrin ku, ez bi xwe
me; werin, destên xwe bidin be-
dena min û bibînin; ji ber ku heçî
ruh e, bê goşt û bê hestî ye, lê belê
a vay, mîna ku hûn min dibînin,
ez bi goşt û hestî me! 40 Paşî wî
ev ji wan re got, dest û lingên xwe
nîşanî wan da.
41 Lê belê wan ji şabûnê û ji ber
gellekî ecêb mabûn, hîn jî bawer
nedikirin; wî ji wan re got: Ka
tiştekî xwarinê li cem we heye?
42 Wan jî pariyek ji masiyekî
biraştî dan wî. 43 Wî ew ji destê
wan girt û li pêş wan xwar.
44 Û wî ji wan re got: Ew go-
tinên min, yên ku gava ez hîn bi
we re bûm, min ji we re gotibû:
Divê ew hemû tiştên ku di zago-
na Mûsa de û di peyxamberan de
û di Zebûran de li ser min hatine
nivîsandin, werin cîhê xwe, ev
in. 45 Li ser vêya, wî hişên wan

vekir ku, ew bikaribin Nivîsên
Pîroz fêhm bikin. 46 Û wî ji wan
re got: Ûsa hatiye nivîsandin ku,
Mesîh dê eziyetê bikişîne û dê
roja sêwemîn ji nav miriyan bi-
veje 47 û dê ji Orşelîmê were
dest pê kirin û ji bona bexşandina
gunehan tobe bi navê wî ji hemû
gelên dinê re bête îlan kirin[1].
48 Hûn şahdeyê van tiştan in!
49 Û a vay, ez ê wada Bavê xwe bi
ser we ve bişînim; lê belê heta ku
ji jor ve hêz li we bête pêçandin,
hûn li bajêr[2] bimînin!

*Îsa hildikişe ezmanan*

Marq 16,19,20; K. Şa 1,9-11

50 Û wî wan derxist û bir heta Bey-
tanyayê û li wê derê wî destên xwe
hilda û wan pîroz kir. 51 Û wusa
bû ku, wê gava ku wî wan pîroz di-
kir, ew ji wan cuda bû, hat rakirin û
hilkişî nava ezmanan. 52 Ew jî ji wî
re peristin û paşê bi kêfxweşiyekî
zehf mezin, vegeriyan Orşelîmê.
53 Û ew her tim di Perestgehê de
bûn û pesnê Xwedê didan.

1 Bê bang kirin.

2 Orşelîm.

# MIZGÎNIYA ÎSA MESÎH LI GOR YÛHENA

BAWERÎ Û JIYAN

*Pêşgotin*

Nivîskarê vê Pirtûka ku di dawiya sedsala pêşîn de, bi peyxama Xwedê ve hatiye nivîsandin, nayê zanîn. Mirov fêhm dike ku, nivîskarê vê Pirtûka, Yûhena yê ji donzdeh şagirtên Îsa, yek e. Yûhena, xwe bi gotina, şagirtê ku Îsa ji wî hez dikir, dide nasîn (13:23; 21:7,20; 19:26). Nivîskar dibêje ku, bi rasterast bûye şahdeyê van bûyerên ku nivîsandiye (1:14; 19:35; 21:24).

Mijara serete ya vê pirtûkê, mîna ku di destpêkê de jî tê xuyakirin; ya di bedena mirov de hatiye daxuyanîkirin, Gotina Xwedê ya bêpêşî ye (1:1-18). Nivîskar, qala heyşt mûcîzetên Îsa yên ku nehatine dîtin û hêzdar in û vejîna Îsa ya ji nava miriyan dike. Û dide xuyanî kirin ku, bona mirov bi Mesîh ve baweriya xwe bînin û bigihêjin jiyana bêdawîn, van nîşanan nivîsandiye (20:30,31).

Îsa, 'Rê, rastî û jiyan ez im' dibêje (14:6). Di vê nivîsê de, Îsa hebûnên di derheqê jiyana rojane de bi avayekî tê dîtin xuyanî dike û ji nêzîk ve rastiya ruhanî ronahî dike; mîna av, nan, şivan, mîh, hwd.

Nivîsa Yûhena, cihetiyek ji nivîsên Meta, Marqos û Lûqa ve dide xuya kirin. Ew bi pirranî qala xizmeta Îsa, ya li Celîlê dikin, lê belê Yûhena, li ser xizmeta wî yî ya li Orşelîmê disekine. Ew hînkariya Îsa, bi mînak û wekokan ve tînin ziman, lê belê Yûhena vana bi axaftinên rû bi rû tîne zimên. Xeynî vana gelek cihêtiyên din jî hene. Ji ber ku, her nivîskarek, bangî civakên xwendekarên din kirine. Wekî din, Yûhena, ji her sê nivîskarên din, bi derengahî vê nivîsa nivîsandiye. Mirov dikare vê nivîsa bi vî awayî kurt bike:

1. Destpêk 1:1-18
2. Daxuyanîkirina Îsa ji dinê re 1:19-12-50
3. Daxuyanîkirina Îsa ji şagirtan re 13:1-17:26
4. Xaçkirina Îsa û vejîna wî 18:1-20:31
5. Gotina paşîn 21:1-25

*Gotina bêpêşî*

1.Yû 1,13; Kol 1,15-17; Îbr 1,1-12;
Pey 19,13; 1.Tîm 3,16

1 Di destpêkê de Gotin hebû û
Gotin bi Xwedê re bû û Gotin
Xwedê bû. 2 Ew, di destpêkê de
bi Xwedê re bû. 3 Her tişt bi wî re
çêbûn[1] û ji tiştên ku bûyîne tu tişt
bêyî wî nebûn. 4 Jiyan di wî de
bû û jiyan ronahiya mirovan bû.
5 Ronahî di tariyê de ronî dike[2] û
tariyê wê fêhm nekir.
6 Zilamekî ku ji aliyê Xwedê ve
hatibû şandin derket holê, navê wî
Yehya bû. 7 Ew ji bona şahdeyiyê
hat, da ku, ew ji ronahiyê re
şahdeyiyê bike ku hemû mirov bi
navgîniya wî bawer bikin. 8 Ew
bi xwe ne ronahî bû, lê bona ku
ji ronahiyê re şahdeyiyê bike hat.
9 Ronahiya rasteqîn, ya ku hemû
mirovan ronahî dike, dihat dinê,
hebû. 10 Ew li dinê bû[3] û dinê bi
navgîniya wî hate afirandin, lê belê
dinê wî nas nekir. 11 Ew ji yên xwe
re hat, lê belê yên wî, ew qebûl ne-
kirin. 12 Lê belê rayedariya bûyîna
zarokên Xwedê da hemûyên ku wî
qebûl kirine û bi navê wî ve bawerî
anîne. 13 Ew kes ne ji xwînê, ne ji
xwestina bedenê û ne jî bi daxwaza
mirov; lê ji Xwedê ve bûn[4].
14 Û Gotin bû beden û bi xêr û
rasteqîniyê ve tijî, di nav me de
jiya; me jî bilindahiya wî, wekî
bilindahiya Lawê tekane yê Bav
e, dîtin.

*Şahdeyiya Yehya ya yekemîn:*
*Ew di nav me de disekine*

Met 3,1-12; Marq 1,7-8;
Lûq 3,15-18; Male 3,1

15 Yehya bona wî şahdeyiyê kir,
bang kir û got: Yê ku ji we re di-
gotim: Yê ku li pey min tê di ser
min re ye; ji ber ku ew berî min
hebû; ev e.
16 Û me hemûyan ji tijîbûna wî,
dilovanî[5] li ser dilovaniyê girtin.
17 Ji ber ku zagon bi destê Mûsa
ve hate dayîn, lê belê dilovanî û
rastî bi destê Îsa Mesîh ve hatin.
18 Tu carî, tu kesî Xwedê nedîti-
ye; Lawê tekane, yê ku di him-
bêza Bav de ye, wî bi xwe ew da
bang kirin[6].
19 Dema Cihûdan ji Orşelîmê
kahîn û Lêwî şandin ku, ji Yehya
bipirsin: Tu kî yî? Şahdeyiya
Yehya ew e. 20 Û wî ser tiştekî
nenuxumand û bi eşkereyî got:
Ez ne Mesîh im! 21 Wan jî jê
pirsîn: Wê çaxê tu kî yî? Ma tu
Êlyas î? Û Yehya got: Ne ez im!
Ji pirsa: Ma tu ew Peyxamber î?
Yehya bi gotina: Na! bersivê da.
22 Niha, wan jê re gotin: Ma tu
kî yî? Bona em bersivê bidin yên

1 Afirîn.
2 Şewle dike.
3 Ew di dinê de bû.
4 Welidîn, çêbûn.
5 Lutif, say, qencî, xêr, an jî: Kerem.
6 Da bihîstin, da zanîn.

ku me şandine: Ma tu ji bo xwe çi
dibêjî? 23 Wî bi gotina daxuyanî
kirina Yeşaya peyxamber bersiv
da wan: Ez dengê ku bi gotina:
Rêya Xudan rast bikin! ji çolê ve
bang dike me[1]. 24 Kesên hatibûn
şandin, ji Fêrisiyan[2] bûn. 25 Û
wan ji Yehya pirsîn û jê re gotin:
Madem ku tu ne Mesîh î, ne Êl-
yas î û ne jî ew Peyxamber î, ma
çima tu vaftîzê dikî? 26 Yehya
bersiv da wan û got: Ez bi avê
vaftîz dikim, lê belê di nav we
de yekî din ku hûn wî nas nakin
heye; 27 yê ku li piştî min tê, ew
e; ew berî min hebû û ez ne li-
yaq im ku bendê çarixê wî vekim.
28 Vana ji wêdetira Urdunê, li
Beytanyayê, li cîhê ku Yehya
vaftîzê dikir çêbûn.

*Şahdeyiya Yehya ya duwemîn:*
*A vay, Berxê Xwedê*

1.Yû 2,2; 2.Mûs 12,1-13; 1.Pêt 1,19;
1.Kor 5,7; Pey 5,6-10; Met 3,13-17

29 Dotira rojê Yehya dît ku Îsa
ber bi wî tê û wî got: A vay, Berxê
Xwedê yê ku gunehên dinê radi-
ke[3]! 30 Kesê ku ji bona wî gotibûm:
Piştî min zilamekî ji min seretetir
e tê, ji ber ku ew berî min hebû, ev
e. 31 Û min bi wî nedizanîbû, lê
belê bona ku ew ji Îsraêlê re bête
gîhandin, ez hatim û bi avê vaftîz
kirim. 32 Yehya şahdeyî kir û got:
Min dît ku Ruh ji ezmanan mîna
kevokekê hate xwar û li ser wî
sekinî. 33 Û min bi wî nizanîbû;
lê belê yê ku min, bona ez bi avê
vaftîz bikim şandiye, bi xwe ji
min re got: Ger tu bibîne Ruh bi
ser kî ve dakeve û bisekine, yê ku
bi Ruhê Pîroz vaftîz bike, ew e.
34 Min jî dît û şahdeyiyê kir û got,
Lawê Xwedê ev e. 35 Dotira rojê
Yehya dîsa tevî du şagirtên xwe
disekinî 36 û gava ku Îsa digeriya,
ew li wî nihêrt û got: A vay, Berxê
Xwedê!

*Şagirtên Îsa yên pêşiyê*

Yû 17,6; 6,44-45

37 Û dema ku wan herdu şagirtan
gotina wî bihîstin, ew li pey Îsa
çûn. 38 Îsa dema ku vegeriya, dît
ku ew li pey wî tên; wî ji wan re
got: Hûn li çi digerin? Wan jî ji wî
re gotin: Rebbî (ku wergera wê:
Mamoste ye) tu li ku derê rûdinî?
39 Wî ji wan re got: Werin û
bibînin! Ew hatin û cîhê ku Îsa lê
rûdinişt dîtin û wê rojê li cem wî
man. Saet wê çaxê deh bû. 40 Yek
ji du kesên ku ji Yehya bihîstin û
li pey Îsa çûn, Andrêyasê birayê
Şîmûn Pêtrûs bû. 41 Wî pêşiyê
birayê xwe Şîmûn dît û jê re got:
Me Mesîh (ku wergera wê: Yê

---

[1] An jî: Bilind dibe me. Îşaya 40:3
[2] Di Cihûdan de firqekî olê.
[3] Ji navê hiltîne, an jî: Dikişîne.

ku hatiye mesh kirinê[1] ye) dîtin.
42 Û wî ew bir cem Îsa. Îsa li
wî nihêrt û got: Tu Şîmûnê lawê
Yûhena yî; tuyê bi navê Kîfas (ku
wergera wê: Pêtrûs e[2]) ve bête
bang kirin.
43 Dotira rojê, Îsa xweste ku here
Celîlê; wî Fîlîpûs dît û ji wî re got:
Li pey min were! 44 Fîlîpûs jî ji
Beytsaydayê, ji bajarê Andrêyas
û Pêtrûs bû. 45 Fîlîpûs Natanyêl
dît û jê re got: Me Îsayê Nisretiyê
lawê Ûsiv, yê ku Mûsa di zagonê
de û peyxamberan ji bona wî ni-
vîsandine, dîtin. 46 Natanyêl jê
re got: Ma ji bajarê Nisretê tiştekî
qenc derdikeve? Fîlîpûs ji wî re
got: Were û bibîne! 47 Îsa dît ku
Natanyêl ber bi wî tê û di derheqê
wî de got: A vay, Îsraêliyek raste-
qîn, yê ku di dilê wî de fenekî nîne!
48 Natanyêl ji wî re got: Tu min ji
ku nas dikî? Îsa bersiv da û jê re
got: Berî ku Fîlîpûs bangî te bike,
min te di bin dara hêjîrê de dîtibû!
49 Natanyêl bersiv da û ji wî re
got: Mamoste, tu Lawê Xwedê yî,
tu Qiralê Îsraêlê yî! 50 Îsa bersiv
da û ji wî re got: Ji ber ku min ji
te re got: Te di bin dara hêjîrê de
dîtim, tu bawer dikî? Tuyê tiştên
ji vê hîn jî mezintir bibînî! 51 Û
jê re got: Bi rastî û bi rastî ez ji
we re dibêjim: Hûn ê vekirina ez-
manan û milyaketên Xwedê, bi
ser Lawê Mirov[3] ve bilind dibin û
têne xwarê; bibînin!

*Nîşana pêşiyê*

Yû 5,36

2 Û roja sisiyan li Kanaya Celîlê
dawetek hebû û dayika Îsa jî li
wê derê bû. 2 Îsa û şagirtên xwe
jî hatibûn dawet kirin. 3 Û dema
xemr kêm bû, dayika Îsa jê re
got: Xemra wan nîne! 4 Îsa ji wê
re got: Pîrek, ma te çi ji min e?
Dema min hîn nehatiye! 5 Dayi-
ka wî, ji xizmetkaran re got: Ew ji
we re çi bêje, wê bikin!
6 Li wê derê ji bo kevneşopên
paqijiyê ya Cihûdan, şeş kûpên
kevirî hebûn ku di her kûpekê de
du an jî sê metrît[4] av bi cîh dibû.
7 Îsa ji xizmetkaran re got: Kûpan
bi avê tijî bikin! Û wan heta ber
dêv tijî kirin. 8 Û wî ji wan re got:
Niha derxinin û ji serokê şahiyê
re bibin! Û wan jî birin. 9 Gava
serokê şahiyê ew ava ku bûbû
xemr tam kir, wî nizanîbû ku ew
ji ku hatiye, (lê belê xizmetkarên
ku av ji kûpê ve derxistibûn, di-
zanîbûn); serokê şahiyê bangî
zava kir û got: 10 Her kes pêşiyê
xemra qenc û paşî ku zehf ve-
xwarin, ya ne qenc dide; lê belê te
xemra qenc heta niha veşartiye!

1 Di zimanê Grekî de Hrîstos, Mesîh; yanê tête maneya bi rûn ve hatiye mesh kirin; yê ku hatiye bijartin.

2 Bi Grekî kevir, lat, zinar.

3 Mana Lawê Mirov, Îsa Mesîh e.

4 Kêm zêde 39 lîtir.

11 Îsa ev nîşana[1] xwe ya pêşiyê,
li Kanaya Celîlê çêkir û qudre-
ta xwe nîşan da û şagirtên wî jî
bawerî bi wî anîn. 12 Paşî vêya
Îsa û dayika wî û birayên wî û
şagirtên wî bi hev re daketin Ke-
fernahûmê û ew gellek rojan li
wê derê neman.

*Îsa Perestgehê paqij dike*

Met 21,12-13; Marq 11,15-18; Lûq 19, 45-46

13 Û Fisiha Cihûdan nêzîk bû;
Îsa jî hilkişiya Orşelîmê. 14 Di
Perestgehê de firotkerên dewar,
mîh û kevokan û yên ku pere
hûr dikirin pev re rûniştî dîtin.
15 Û wî ji bendikan qamçiyek
çêkir, hemû tev dewar û mîhên
wan ji wir avêt derve, pereyê
kesên ku pere hûr dikirin, rijand
û maseyên wan gêr kir 16 û wî ji
yên ku kevokan difirotin re got:
Vana ji vê derê rakin, mala Bavê
min nekin mîna cîhê bazarê!
17 Şagirtên wî, ew yeka ku ha-
tiye nivîsandin anîn bîra xwe:
Xîreta ku min ji bo mala te kir,
dê min bixwe[2].
18 Wê demê Cihûdan bersiv
dan û ji wî re gotin: Ma tuyê di
derheqê rastiya van karên ku te
kirine de, çi elametê[3] nîşanî me
bidî? 19 Îsa bersiv da û ji wan re
got: Vê Perestgehê xera bikin,
ez ê wê di sê rojan de rakim!
20 Wê demê Cihûdan gotin: Ev
Perestgeh di çel û şeş salî de ha-
tiye avakirin, ma tuyê vêya di sê
rojan de rakî? 21 Lê belê Îsa qala
Perestgeha bedena xwe dikir.
22 Dema ew ji mirinê rabû,
şagirtên wî vê gotina anîn bîra
xwe û baweriyê bi gotina Îsa û bi
Nivîsên Pîroz anîn.
23 Û gava ew di Cejna Fisihê de
li Orşelîmê bû, gellek kesên ku ev
nîşanên ku wî kirine dîtin û ba-
werî bi navê wî anîn. 24 Lê belê
Îsa, bi wan bawer nedikir; ji ber
ku wî hemûyê mirovan nas dikir[4].
25 Ji ber ku bona mirov hewce-
dariya wî qet ji şahdeyiya tu kesî
re tunebû; ji ber ku wî bi xwe, bi
tiştê di mirov de bû dizanîbû.

## ÎSA Û NÎKODÊMÛS

*Mirov çawa dikare dîsa biwelide?*

3 Di nav Fêrisiyan de, zilamek
bi navê Nîkodêmûs hebû ku
rêberekî Cihûdan bû. 2 Ev zilama
bi şev hate cem Îsa û ji wî re got:
Rebbî[5], em dizanin ku tu mamos-
teyekî ji Xwedê ve hatiye yî; ji ber
ku ger Xwedê ne bi wî re be, qet
kesek nikare van mûcîzetên ku tu
çêdikî, bike. 3 Îsa bersiv da û ji
wî re got: Bi rastî û bi rastî ez ji te
re dibêjim: Heta ku mirovek ji nû

[1] Mûcîzeta.
[2] Zebûr 69:9
[3] Nîşanê.
[4] An jî: Hemû nas dikir.
[5] Mamoste.

ve newelide[1], nikare Serweriya[2]
Xwedê bibîne!
4 Nîkodêmûs jê re got: Ger mirov
kal be, çawa dikare biwelide? Ma
dikare ku cara duwemîn bikeve
rehma dayika xwe û biwelide?
5 Îsa bersiv da: Bi rastî û bi rastî
ez ji te re dibêjim: Heta ku miro-
vek ji avê û ji ruh ve newelide,
nikare bikeve Serweriya Xwedê!
6 Yê ku ji bedenê welidiye beden
e û yê ku ji Ruh ve welidiye Ruh
e. 7 Şaş nebe ku, min ji te re got:
Hûn divê ji nû ve biwelidin! 8 Ba
ji kîjan alî ve bixwaze ûsa tê; tu
dengê wê dibihîzî, lê belê ji ku ve
tê û diçe ku derê, tu wê nizanî; her
kesê ku ji Ruh welidîne jî ûsa ne.
9 Nîkodêmûs bersiv da û ji wî re
got: Vana çawa dikarin çêbibin?
10 Îsa bersiv da û ji wî re got:
Tu mamosteyê Îsraêlê yî û dîsa
jî vana fêhm nakî? 11 Bi rastî û
bi rastî ez ji te re dibêjim: Em
tiştê ku dizanin dibêjin û ji tiştê
ku me dîtine re şahdeyiyê dikin
û hûn şahdeyiya me qebûl nakin.
12 Dema ku min ji we re qala tiştê
dinê kir we bawerî nekir, wê çaxê
ger ez qala tiştê ezmanî bikim hûn
ê çawa bawer bikin? 13 Tu kes
hilnekişiyaye ezman; tenê Lawê
Mirov yê ku ji ezman hatiye xwar
hilkişiyaye; ew ku, li ezmanê ye.

*Îsa Mesîh, Lawê Xwedê û*
*Xelaskerê dinê ye*

1.Yû 4,9-10; Rom 5,6-11; Yû 6,38-40

14 Û çawa ku Mûsa di çolê de
mar bilind kir, divê Lawê Mi-
rov[3] jî ûsa bilindî jor bibe; 15 da
ku, her kesê bawerî bi wî bîne,
bila helaq nebe; lê jiyana wî ya
abadîn hebe.
16 Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji
dinê hez kir ku, Lawê xwe yê te-
kane da; da ku, bila tu kes, ji yên
bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê
bila jiyana wî ya abadîn hebe.
17 Ji ber ku Xwedê bona dinê
daraz bike Lawê xwe neşand, lê
bona ku dinya bi wî xelas bibe,
wî şand. 18 Ew kesê ku bawerî
bi wî bîne, nayê daraz kirin; lê
belê yê ku bawerî bi wî neaniye,
ew jixwe hatiye daraz kirin; ji
ber ku wî bawerî bi navê Lawê
Xwedê yê tekane neaniye. 19 Û
darazî ev e ku, ronahî hat dinê
û mirovan ji ronahiyê zêdetir ji
tariyê hez kirin; ji ber ku karên
wan xerabî bû. 20 Ji ber, her
kesê ku xerabiyê dike, ji ronahi-
yê dikerihe û ji bo ku xebatên wî
xuya nebin, ew nayê ronahiyê.
21 Lê belê bona, şuxulandina
karê wî yê di Xwedê de bête
xuyanî kirin, yê ku rasteqîniyê
dike, tê ronahiyê.

1 An jî: Ji jor ve nebe, li ayeta 31 û li 19:11 an binihêre.
2 Padîşahiya Xwedê.
3 Yanê Îsa Mesîh.

*Şahdeyiya Yehya ya sêwemîn: Yê ku ji*
*ezman ve hatiye, li ser her kesî re ye*

22 Piştî vêya, Îsa û şagirtên xwe
hatin warê Cihûstanê û Îsa li wê
derê, bi wan re ma û vaftîz di-
kir. 23 Yehya jî nêzîkî Salîmê, li
Aynonê vaftîz dikir; ji ber ku li wê
derê zehf av hebû û ew dihatin û li
wê derê vaftîz dibûn. 24 Ji ber ku
Yehya hîn neavêtibûn zîndanê.
25 Û di navbera şagirtên Yehya
û Cihûdekî de, di derheqê
kevneşopiya paqijbûnê de guf-
tegoyek derket. 26 Û ew hatin
cem Yehya û gotin: Mamoste, yê
ku li aliyê çemê Urdunê bi te re bû,
zilamê ku te ji bo wî şahdeyiyê kir,
a vay, ew kes vaftîz dike û her kes
tên cem wî! 27 Yehya bersiv da û
got: Dema ku ji jor ve tiştek neyê
dayîn, kesek nikare tiştekî bistîne.
28 Min got ez ne Mesîh im, lê ez
nûçevanê wî me û hûn jî şahdeyê
van gotinê min in. 29 Bûk ya kî
be, zava jî ew e; lê belê yê ku li
ser lingan disekine û wî dibihîze,
hevalê zavê ji ber dengê zavê,
zehf kêfxweş dibe. Ji bo vê yekê
ev kêfxweşiya min, temam bû.
30 Bona wî mezinahî, bona min jî
biçûk bûn hewce dike. 31 Yê ku ji
jor ve hatiye, ji hemûyan bilindtir
e; yê ku ji erdê ye, ji erdê ye û
ji erdê ve dibêje; yê ku ji ezman
ve hatiye, li ser her kesî re ye.
32 Wî çi dîtibe û çi bihîstibe ji wê
re şahdeyiyê dike û kes şahdeyiya
wî qebûl nake. 33 Yê ku şahdeyiya
wî qebûl dike, mohrê pê xistiye
ku, Xwedê rastî ye. 34 Ji ber, kesê
ku Xwedê wî şandiye, gotinên
Xwedê dibêje; ji ber ku Xwedê,
Ruh bi pîvanê nade. 35 Bav ji
Law hez dike û her tiştî daye destê
wî. 36 Yê ku baweriyê bi Law
bîne jiyana wî ya abadîn heye; lê
belê yê ku ji Law re îtaetê nake[1],
ew jiyanê nabîne, lê belê xezeba
Xwedê li ser wî dimîne.

*Ava jiyana abadîn*

Îşa 55,1; Yû 7,37-39; Pey 22,17

4 Dema Xudan hîn bû ku Fêri-
siyan bihîstiye, Îsa ji Yehya
hîn jî zêdetir şagirtan civandiye û
vaftîz dike, 2 – lê Îsa ne bi xwe,
tenê şagirtên wî vaftîz dikirin –;
3 ew ji Cihûstanê weqetiya û dîsa
çû Celîlê. 4 Û hewce dikir ku ew
ji Samîriyê ve derbas bibûya. 5 Bi
vî awayî, ew hat nêzîkî zeviya[2] ku
Aqûp dabû lawê xwe Ûsiv, baja-
rekî Samîriyê, ya ku jê re digo-
tin Sîhar. 6 Bîra Aqûp li wê derê
bû. Bona ku Îsa di rêwîtiyê de
westayî bû, bi vî awayî ew li cem
bîrê rûniştibû; saet devdevî şeşan
bû. 7 Pîrekek ji Samîriyê hat ku
avê bikişîne. Îsa ji wê re got: Avê
bide min, ez vexwim! 8 Ji ber ku

[1] An jî: Law guhdarî neke.

[2] Erdê.

şagirtên wî ji bo stendina xwarinê
çûbûn bajêr. 9 Pîreka Samîriyê
jî ji wî re got: Tu Cihûd e û ez jî
pîrekek Samîrî me, çawa tu ji min
avê dixwazî? Ji ber ku Cihûdan
karekî bi Samîriyan re nakin.
10 Îsa bersiv da û ji wê re got: Ger
te bi xelata Xwedê û bi kîbûna yê
ku ji te re: Avê bide min ku ez ve-
xwim! dibêje bizanîbûya, teyê ji wî
bixwesta û wî jî dê ava zindî bida te.
11 Pîrekê jê re got: Efendî, tiştekî
teyî tu pê avê bikişînî tuneye û bîr
jî kûr e; ma niha ava zindî ji ku derê
ve bi te re heye? 12 Ma tu ji bavê
me Aqûp, yê ku vê bîrê daye me û
tevî law û dewarên xwe ji wê ve-
xwariye, mezintir î? 13 Îsa bersiv da
û ji wê re got: Her kesê ku ji vê avê
vexwe, dê dîsa tî bibe. 14 Lê belê
her kî, ji ava ku ez bidimê vexwe, tu
carî tî nabe; lê ava ku ez bidim wî,
di wî de ji bo jiyana abadîn dibe ka-
niya ava ku diherike. 15 Pîrekê jê re
got: Efendî, vê avê bide min ku ez
ne tî bibim û ne jî bona av kişandinê
heta vê derê werim!
16 Îsa ji wê re got: Here bangî
mêrê xwe bike û were vê derê!
17 Pîrekê bersiv da û got: Mêrê
min tune! Îsa ji wê re got: Bona
ku te got mêrê min tune, tu rast
axifî! 18 Ji ber ku te pênc mêrî
kiribû û yê ku tu niha tevî dise-
kinî ne mêrê te ye. Te vêya rast
got! 19 Pîrekê ji wî re got: Efen-
dî, ez dibînim ku tu peyxamberek
î! 20 Kalikên me li vî çiyayî pe-
ristinê kirin û hûn dibêjin ku cîhê
peristinê li Orşelîmê ye. 21 Îsa ji
wê re got: Pîrekê, bi min bawer
bike, dem tê ku, wê çaxê ne li wî
çiyayî û ne jî li Orşelîmê hûn ê ji
Bav re peristinê bikin! 22 Hûn ji
yê ku hûn pê nizanin re peristinê
dikin, em ji yê ku em pê dizanin
re peristinê dikin; ji ber ku xe-
lasî ji Cihûdan ve tê! 23 Lê belê
saeta, yên ku bi rastî peristinê
dikin, di ruh û rasteqîniyê de pe-
ristinê ji Bav re bikin tê û niha
ye; ji ber ku Bav li yên ku bi vî
awayî peristinê jê re dikin digere.
24 Xwedê Ruh e, kesê ku ji wî re
peristinê dikin, divê di ruh û ras-
tiyê de peristinê bikin. 25 Pîrekê
ji wî re got: Mesîh yê ku hatiye
mesh kirinê, ez zanim ku dê ew ê
were û ew ê her tiştî bigihîne me.
26 Îsa ji wê re got: Yê ku bi te re
diaxife, ez, ew kes im!
27 Li ser vê yekê şagirtên wî ha-
tin û ji ber ku Îsa bi pîrekekê re
diaxifî ew şaş man. Lê bele dîsa jî
qet kesî negot: Ma tu li çi digerî?
an jî: Ma tu çima bi wê pîrekê re
diaxifî? 28 Pişt re pîrekê kûzê avê
di cîh de hişt û çû bajêr û ji gel re
got: 29 Werin, mirovê her tiştê ku
min kiriye ji min re got bibînin!
Gelo Mesîh ev e? 30 Ew jî ji bajêr
derketin û hatin cem wî.
31 Di vê navberê de şagirtan jê
rica kirin û gotin: Rebbî, bixwe!

32 Lê belê Îsa ji wan re got: Xwa-
rinek min heye, hûn pê nizanin!
33 Şagirtan ji hev û din re gotin:
Gelo kesî ji wî re xwarin aniye?
34 Îsa ji wan re got: Xwarina min,
bi cîh anîna xwestina yê ku min
şandiye û serfiraziya karê wî ye.
35 Ma hûn nabêjin: Hîn bona zad
çinînê çar meh heye? A vay, ez ji
we re dibêjim: Serê xwe bilind
bikin û li zeviyên ku bona bête
çinîn zer bûne binihêrin! 36 Bona
yê ku ajotiye û yê ku diçîne pev
re kêfxweş bibin, yê ku diçîne
heqdestê xwe digire û ji bo jiyana
abadîn zadê dide hev. 37 Ji ber ew
gotina ku: Yek dajo û yekî din jî
diçîne, di vêya de rast e. 38 Min
we, ji bo çinîna zadê ku we ji bo
wê ked nedane şand; hinekên din
ked dan û hûn ketin keda wan.

*Gelê Samîriyê bawerî bi Îsa tînin*

K.Şa 8,12.14; Yû 20,30-31

39 Li ser gotina pîreka ku:
Hemû kirinên min, ji min re got,
şahdeyiyê kiribû, li wî bajarî ji
Samîriyan gellekan bawerî bi Îsa
anîn. 40 Dema ku Samîrî hatin
cem wî, bona ku li cem wan bimî-
ne li ber wî geriyan; ew jî du roj li
wir ma. 41 Û li ser gotina wî, hîn
gellek kesên din jî bawerî anîn.
42 Û ji pîrekê re digotin: Êdî ba-
werî anîna me ne li ser gotina te
ye; ji ber ku me bi xwe bihîstin û
em dizanin ku bi rastî Xelaskerê
dinê ev e!

*Îsa lawê karmendekî baş dike*

Îbr 11,1.6

43 Piştî van herdu rojan, Îsa ji
wir çû Celîlê. 44 Ji ber ku Îsa bi
xwe di derheqê peyxamberek di
welatê xwe de ne bi qedr û qîmet
e de şahdeyiyê kiribû. 45 Gava ku
ew hate Celîlê, Celîliyan wî qe-
bûl kirin; ji ber ku ew jî beşdarî
cejnê bûbûn û di dema cejnê de,
hemû tiştên ku li Orşelîmê kiribû,
dîtibûn.
46 Li ser vêya, Îsa dîsa hat Kana-
ya Celîlê ku wî li wê derê avê ki-
ribû xemr û li wir karmendekî qi-
ral hebû, lawê wî li Kefernahûmê
nexweş bû. 47 Dema ku wî bihîst
Îsa ji Cihûstanê hatiye bajarê
Celîlê, çû cem wî û jê rica kir ku
ew were lawê wî yê nexweş baş
bike, ji ber ku ew li ber mirinê bû.
48 Wê demê Îsa ji wî re got: Hûn
heta ku alamet û nuwaze nebînin,
tu carî baweriyê naynin! 49 Kar-
mendê qiral ji wî re got: Efendî,
berî ku lawê min bimire, dakeve[1]!
50 Îsa jê re got: Here, lawê te dijî!
Zilam bawerî bi gotina ku Îsa ji
wî re gotibû, anî û çû. 51 Hîn ew
di rê de bû, xulamên wî derketin
pêrgîniya wî û jê re gotin: Lawê te
dijî! 52 Wî, saeta ku lawê wî dest
bi başbûnê kiriye ji xulaman pirsî.

[1] Bigihêje, dakeve jêr, an jî: Xwe bigihîne ser.

Wan jî ji wî re gotin: Doh, di saeta
heftemîn de ta wî berda. 53 Wê
çaxê bav fêhm kir ku, ev ew saeta
Îsa ji wî re gotibû ku: Lawê te
dijî ye! û wî bi temamê gelê mala
xwe ve bawerî anîn. 54 Dema Îsa
ji Cihûstanê hat Celîlê, ev mûcîza
duduyan bû ku wî çêkir.

*Mirovê ku sî û heyşt sal e nexweş e tê başkirin*

K.Şa 10,38; Yû 7,19-24

5 Piştî vêya cejneke Cihûdan
hebû û Îsa çû Orşelîmê. 2 Li
Orşelîmê, li cem Deriyê Mîhê,
hewzek[1] bi zimanê Îbranî jê re
Beythesta tê gotin; ya ku pênc
eywanên[2] wê hebûn, heye. 3 Di
nav vana de civakek mezin ya
nexweşan, ya ji kor û kûd û falinc
radiketin; ew li benda çelqandina
avê bûn. 4 Ji ber ku dem demî mil-
yaketekî Xudan dadiket nav û avê
diçelqand. Paşî ku av diçelqiya,
kesê ku pêşiyê biketa nav avê, her
bi çi nexweşiyê ve ketibe, ji wê ve
xelas dibû[3]. 5 Û zilamekî ku sî û
heyşt sal nexweşiya xwe dikişîne
li wê derê bû. 6 Gava Îsa wî veketî
dît û bi zanîna ku ew demekî dirêj
e nexweş e; jê re got: Ma tu di-
xwazî baş bibî? 7 Nexweş bersivê
da wî: Efendî, dema ku av diçel-
qe[4], kesê min tune ku min deyne
nav avê û dema ku ez têm, berî
min yekî din dikeve nav avê. 8 Îsa
ji wî re got: Rabe, livînê xwe hil-
de û bimeşe! 9 Û zilam hema baş
bû û livînê xwe hilgirt û meşiya.
Ew roj roja Sebtê bû.
10 Ji ber vê yekê Cihûdan ji wî
mirovê ku baş bûye re gotin: Îro
Sebt e; ji te re ne caiz e ku tu livînê
xwe rake! 11 Lê belê wî bersiv da
wan: Ew mirovê ku ez baş kirim,
ji min re got, livînê xwe hilgire û
bimeşe! 12 Wan jê pirs kirin: Mi-
rovê ku ji te re got: Livînê xwe
hilgire û bimeşe kî ye? 13 Lê belê
zilamê ku baş bûbû, nezanîbû ku
ew kî ye; ji ber ku li wê derê zehf
ajawe hebû, Îsa vekişiyabû.
14 Piştî vêya, Îsa wî di Perest-
gehê de dît û ji wî re got: A vay,
tu baş bûyî; êdî gunehan neke ku
tiştek hîn jî xerabtir neyê serê te!
15 Mirov çû cem Cihûdan û ji wan
re got, ew mirovê ku ez baş kirim
Îsa ye. 16 Ji bo vê yekê Cihûdan
li Îsa digeriyan û dixwestin ku wî
bikujin; ji ber ku wî, vî karî di roja
Sebtê de çêkiribû.

*Îsa bi xwe dibêje ku ew Lawê Xwedê ye*

Yû 10,30-38; 17,1-3; 20,31;
1.Kor 15,20-26; 1.Yû 5,11-13

17 Lê belê Îsa bersiv da wan:
Bavê min heta niha dixebite û

1 Burkek.
2 Hewşên.
3 An jî: Baş dibû.
4 An jî: Pêl dide.

ez jî dixebitim. 18 Ji bo vê yekê
Cihûdan hîn jî bêtir bo kuştina Îsa
xebitîn; ji ber ku ew tenê bi xera
kirina roja Sebtê nema bû, lê belê
bi gotina: Xwedê Bavê min e, wî
xwe bi Xwedê re kiribû yek.
19 Ji bo vê yekê Îsa bersiv da û ji
wan re got: Bi rastî û bi rastî ez ji
we re dibêjim: Xeynî kirina Bav,
ya ku dibîne, Law nikare ji xwe
tiştekî bike; ji ber ku ew her çi
tiştî bike, Law jî wana bi vî awayî
dike. 20 Ji ber ku Bav ji Law hez
dike û hemû tiştên ku ew bi xwe
dike nîşanî wî dide û bona hûn
şaş bimînin, dê ew hîn xebatên ji
vana mezintir nîşanî wî bide. 21 Ji
ber ku Bav, çawa dikaribe miriyan
rake û jiyanê bide wan, Law jî ûsa
bo kî bixwaze wan divejîne. 22 Ji
ber ku Bav tu kesî daraz nake, lê
wî hemû rayedariya darazîkirinê
daye Law; 23 da ku, çawa her kes
hurmetê ji Bav re dikin, bila ji Law
re jî hurmetê bikin. Yê ku hurmetê
ji Law re nake, ew hurmetê ji Bavê
ku wî şandiye re jî nake.
24 Bi rastî û bi rastî ez ji we re
dibêjim: Her kesê ku gotinên min
bibihîze û bawerî bi yê ku min
şandiye bîne, jiyana wî ya abadîn
heye û nayê darazîkirin, lê belê
ew ji mirinê derbasî jiyanê bûye.
25 Bi rastî û bi rastî ez ji we re
dibêjim: Dem tê ku, mirî dê dengê
Lawê Xwedê bibihîzin û niha ye
û yên ku bibihîzin dê bijîn. 26 Ji
ber, çawa ku di Bav de jiyan heye,
bi vî awayî wî vê rayedariyê da
Law jî. 27 Û rayedariya darazî
kirinê jî da wî; ji ber ku ew Lawê
Mirov e. 28 Bi vêya şaş mebin!
Ji ber ku saet tê, di wê saetê de
hemûyên ku di goran de ne, dê
dengê wî bibihîzin 29 û yên ku
qencî kirine dê ji bo qiyameta ji-
yanê û yên ku xerabî kirine dê ji
bo qiyameta darazbûnê derkevin.
30 Ez ji ber xwe nikarim tu tiştî
bikim. Ez çawa dibihîzim ûsa da-
raz dikim û daraziya min rast e; ji
ber ku ez ne li xwestina xwe dige-
rim, lê belê li xwestina yê ku min
şandiye digerim.

*Şahdeyiya Bav ya di derheqê Law de*

1.Yû 5,6-13; Yû 10,29-38; 3,16-19

31 Ger ez bo xwe şahdeyiyê
bikim, şahdeyiya min ne rast e.
32 Yê ku ji bo min şahdeyiyê dike,
yekî din e û ez dizanim şahdeyiya
ku ew ji bo min dike rast e. 33 We
mirov şandin cem Yehya û wî ji
rastiyê re şahdeyiyê kir. 34 Lê belê
şahdeyiya ku min qebûl kiriye, ne
ji mirova ye, lê ji bo hûn xelas bi-
bin ez vana dibêjim. 35 Ew, mîna
çirakê vêketî û şewledar bû û we
xwestin ku, hûn ji bo demekê di
şewla wî de kêfxweş bibin. 36 Lê
belê şahdeyiyekî min heye, ew ji
ya Yehya hîn jî mezintir e; ji ber,
ev karên ku ez dikim, yên Bav
dane min ku ez pêk bînim, ew ji bo

min şahdeyiyê dikin ku Bav min
şandiye. 37 Bavê ku min şandiye
bi xwe jî ji bo min şahdeyiyê kiri-
ye. We tu carî ne dengê wî bihîs-
tine û ne jî wecê wî dîtine. 38 Û
gotina wî di we de nasekine[1]; ji
ber ku hûn bawerî bi kesê ku wî
şandiye, nakin. 39 Hûn lêkolînê li
Nivîsên Pîroz dikin, ji ber ku hûn
dibêjin qey jiyana we ya abadîn
di wan de ye; yên ku ji bo min
şahdeyiyê dikin jî ew in! 40 Û
hûn bona jiyana we hebe, naxwa-
zin ku werin cem min. 41 Ez ji
mirovan pesnahiyê qebûl nakim.
42 Lê belê ez bi we dizanim ku, di
hundirê we de, hezkirina Xwedê
nîne. 43 Ez bi navê Bavê xwe ha-
tim, lê hûn min qebûl nakin. Ger
yekî din bi navê xwe were, hûn ê
wî qebûl bikin. 44 Hûn ku, pesnê
ji hev û din qebûl dikin û ji pesna-
hiya ku ji Xwedayê tekane ve tê
nagerin, ma hûn ê çawa baweriyê
bi min bînin? 45 Hûn nebêjin ku
qey ez we li cem Bav sûcdar di-
kim. Yê ku we sûcdar dike Mûsa
ye, ew ê ku we hêviya xwe bi wî
ve girêdaye. 46 Ji ber ku ger we
bawerî bi Mûsa bianiyana, weyê
bawerî bi min jî bianîna; ji ber ku
wî ji bo min nivîsiye. 47 Lê belê
dema ku hûn bawerî bi nivîsên wî
neynin, ma hûn ê çawa baweriyê
bi gotinên min bînin?

### *Îsa Mesîh pênc hezar kesî têr dike*

Met 14,13-21; Marq 6,30-44; Lûq
9,10-17; 2.Qir 4,42-44

6 Piştî van tiştan, Îsa derbasî ali-
yê hemberî gola Celîlê – yanê,
Taberiyê – bû. 2 Ajaweyek me-
zin li pey wî diçûn; ji ber ku wan
mûcîzetên ku wî li ser nexweşan
çêkiribû, dîtibûn. 3 Îsa derket
çiyê û tevî şagirtên xwe li wê derê
rûnişt. 4 Cejna Cihûdan ya Fisihê
nêzîk bû. 5 Dema Îsa çavên xwe
bilind kir û dît ku ajaweyek mezin
ber bi wî ve tê, wî ji Fîlîpûs re got:
Bona ku vana bixwin, em ji ku
derê nan bikirin? 6 Vêya jî, bona
ku wî biceribîne got, ji ber ku wî
bi xwe dizanîbû ku ew ê çi bike.
7 Fîlîpûs bersiv da wî: Bona ku ji
her yekî re pariyek bikeve, bi du
sed dînarî[2] jî nan qîm nake! 8 Yek
ji şagirtên wî, Andrêyasê birayê
Şîmûn Pêtrûs ji wî re got: 9 Li vir
bi lawikekî re pênc nanê cehînî û
du masî hene; lê belê ji bo ewqas
mirov ev çî ye?
10 Îsa got: Gel li ser erdê bidin
rûniştinê! Li wê derê gellek giya
hebû. Bi hejmarî nêzîkî pênc he-
zar mêr rûniştin. 11 Wê gavê Îsa
nan rahişt, paşî ku şikir kir, li yên
ku rûniştine belav kir; mîna vêya
ji masiyan jî, qasî ku wan xwest,
wî belav kir. 12 Û paşî ku her kes
têr bû, Îsa ji şagirtên xwe re got:

1 An jî: Najî.

2 Li rasteka menan binêrin.

Pariyên ku ji ber mayîne bidin hev,
bila tu tiştek ziyan nebe! 13 Wan jî
berhev kirin û bi parîkên ku, ji ber
yên pênc heb nanê cehînî xwarine
mayîne donzdeh zembîlî dagirtin.
14 Dema gel elameta ku Îsa çêkir
dîtin: Bi rastî peyxamberê ku dê
bihata dinê, ev e! gotin.
15 Ji ber Îsa dizanîbû ku dê werin
û bona ku wî bikin qiral dê bi zorê
wî bibin, ew dîsa bi tena serê xwe
çû çiyê.

*Îsa li ser avê dimeşe*

Met 14,22-33; Marq 6,45-53

16 Û dema ku êvar bû, şagirtên wî
daketin jêr û çûn cem golê. 17 Û ew
li lotkekê siwar bûn û ber bi aliyê
dinî golê, ber bi Kefernahûmê bi rê
ve ketin. Û êdî tarî ketibû ser erdê û
Îsa hîn nehatibû cem wan. 18 Ji ber
ku bayek xwurt dihat gol dinepixî.
19 Bi vî awayî gava ku wan qasî
avêtina bîst û pênc an sî tîrî bêrik
kişandin, wan dîtin ku Îsa li ser avê
dimeşe û nêzîkê lotkê dibe û ew tir-
siyan. 20 Lê belê Îsa ji wan re got:
Ez im, metirsin! 21 Wê gavê wan
xwestin ku wî bigirin lotkê û lotke
hema gîhaşt qeraxa ku ew diçûnê.

*Civak li Îsa digere*

5.Mûs 8,3; Yû 5,39

22 Dotira rojê, gelê ku li aliyê dinî
golê sekinîbûn dîtin ku, li wê derê
xeynî lotkeyek tu lotke tunebû
û tevî şagirtên xwe Îsa lê siwar
nebûbû, lê belê şagirtên wî tenê
çûbûn. 23 Lê belê li nêzîkî cîhê
piştî ku Xudan şikir kir û gel nan
xwarin, li Taberiyê lotkên din jî ha-
tin. 24 Bi vî awayî, dema gel dîtin
ku Îsa û şagirtên wî ne li wê derê
ne, ew li lotkeyan siwar bûn û ha-
tin Kefernahûmê û li Îsa geriyan.
25 Û dema ku wan li aliyê dinî
golê wî dîtin, wan jê re got: Ma-
moste, tu kengê hatî vê derê? 26
Îsa bersiv da wan û got: Bi rastî û
bi rastî ez ji we re dibêjim: Ne ji bo
ku we nîşanê dîtine, lê belê bona
ku we ji nan xwarin û têr bûn, hûn
li min digerin. 27 Ne bona xwari-
na fanî, lê bo xwarina ku di jiyana
abadîn de dimîne bixebitin; dê
Lawê Mirov wê bide we; ji ber ku
Bav, Xwedê vê rayedariyê daye
wî! 28 Û wan ji wî re gotin: Ma
bona ku em karên Xwedê bikin,
divê em çi bikin? 29 Îsa bersiv da
û ji wan re got: Karê Xwedê ev e
ku, hûn bawerî bi wî mirovê ku wî
şandiye bînin.
30 Li ser vê yekê wan jê re gotin:
Niha bona ku em bibînin û bawerî
bi te bînin, tuyê çi elametî dikî?
Tu bi çi bikar tînî? 31 Kalikên me
li çolê manna[1] xwarin; mîna ku
hatiye nivîsin: Bona xwarina wan
wî ji jor ve nan da wan[2].

---

1 (2.Mûsa 16:13-15)

2 Zebûr 78:24

*Îsa nanê jiyanê ye*

2.Mûs 16,4; Zeb 78,23-25; 1.Kor 10,3-4

32 Îsa ji wan re got: Bi rastî û bi
rastî ez ji we re dibêjim: Mûsa ji
jor ve nan neda we, lê belê nanê
rasteqîn ji jor ve Bavê min dide
we. 33 Ji ber ku nanê Xwedê, yê
ku ji ezman ve tê û jiyanê dide
dinê ye. 34 Wan jê re got: Ya
Xudan, vî nanî her tim bide me!
35 Îsa ji wan re got: Nanê jiyanê
Ez im. Yê ku were cem min qet
birçî nabe, yê ku baweriyê bi min
bîne qet tî nabe. 36 Lê belê min ji
we re got, we min dîtin û hûn dîsa
jî baweriyê naynin. 37 Hemûyên
ku Bav daye min, dê werin cem
min û ez tu carî yên ku werin cem
min, şunda venagerînim. 38 Ji ber
ku ez ne bona daxwaziya xwe, lê
bona daxwaziya yê ku min şandiye
bînim cîh, ji ezmanê daketim.
39 Û xwestina yê ez şandime ev
e ku, ez ji hemûyên ku wî dane
min qet kesî winda nekim, lê di
roja dawiyê de wan hemûyan bi-
vejînim. 40 Ji ber xwestina Bavê
min ev e ku, her kesê Law bibîne
û baweriyê bi wî bîne, bila jiyana
wî ya abadîn hebe û ez ê wî di roja
dawiyê de bivejînim.
41 Wê demê Cihûdan, ji ber ku
wî got: Nanê ku ji ezman daket
ez im, ji ber wî, miremirê kirin
42 û gotin: Ma ev ne Îsayê lawê
Ûsiv yê ku em dayik û bavê wî
nas dikin e? Niha çawa dibêje: Ez
ji ezman ve daketim?
43 Îsa bersiv da û ji wan re got:
Di nav xwe de miremirê nekin!
44 Ger Bavê ku ez şandime, kesekî
nekişîne, tu kes nikare were cem
min û ez ê wî di roja dawiyê de
bivejînim. 45 Di peyxamberan de
nivîsandiye: Û hemûyên wan dê
ji aliyê Xwedê ve bêne hînkirin[1].
Her kesê ku ji Bav dibihîze û hîn
dibe, tête cem min. 46 Mana vê ne
ew e ku kesekî Bav dîtiye; lê tenê
yê ku ji Xwedê ye, wî Bav dîtiye.
47 Bi rastî û bi rastî ez ji we re
dibêjim: Yê ku baweriyê bi min
bîne, jiyana wî ya abadîn heye.
48 Nanê jiyanê ez im. 49 Bapîrên
we di çolê de manna xwarin û mi-
rin. 50 Bona her kesê jê bixwe û
nemire, nanê ku ji ezman daketi-
ye ev e. 51 Nanê zindî, yê ku ji
ezman daketiye, ez im. Ger kesek
ji vî nanî bixwe, abadîn dijî. Nanê
ku ez ê ji bo jiyana dinê bidim,
goştê min e.
52 Li ser vê yekê Cihûdan bi hev
re ketin keftûleftê û gotin: Ma ev
zilama bo xwarinê çawa dikare
ku goştê xwe bide me? 53 Li ser
vêya Îsa ji wan re got: Bi rastî û bi
rastî ez ji we re dibêjim: Heta ku
hûn goştê Lawê Mirov nexwin û
xwîna wî jî venexwin, dê di we de
jiyan tune be. 54 Jiyana abadîn ya
kesê ku goştê min bixwe û xwîna

*1* Îşaya 54:13

min vexwe heye û di roja dawîn
de ez ê wî bivejînim. 55 Ji ber
ku goştê min xwarina rasteqînî
û xwîna min vexwarina rasteqînî
ye. 56 Yê ku goştê min bixwe
û xwîna min vexwe, di min de
dimîne û ez jî di wî de dimînim.
57 Bavê zindî mîna ku ez şandim
û ez bi navberiya Bav ve dijîm, bi
vî awayî yê ku min bixwe jî dê bi
navberiya min ve bijî. 58 Nanê ku
ji ezman daketiye ev e; ne mîna
manna ku bapîrên we xwarine û
ew mirine ye; yê ku vî nanî bixwe
dê abadîn bijî! 59 Dema ku wî li
Kefernahûmê hîn dikir, di kenîştê
de van gotinan gotin.

*Dilsoziya bi gotina jiyana abadîn*

Îbr 4,12-13; 10,38-39; 1.Pêt 2,6-9

60 Gellekan ji şagirtên wî, dema
ku vêya bihîstin, gotin: Ev go-
tinek dijwar e! Ma kî dikare wê
bibihîze? 61 Lê belê Îsa dizanîbû
ku şagirtên wî bona vêya mire-
mirê dikin, wî ji wan re got: Ma
ev dibe sedema tilpekîbûna we?
62 Ger hûn bibînin ku Lawê Mi-
rov bilind bibe cîhê ku ew berê
lê bû? 63 Yê ku jiyanê dide Ruh
e; fêda bedenê qet nîne. Gotinên
ku min ji we re gotin, ruh û jiyan
in. 64 Lê belê di nav we de yên
ku bawer nakin hene. Ji ber, Îsa
yên ku bawerî nedikirin û yê ku
dê wî bidaya dest, di destpêkê de
nas dikir û dizanîbû ku ew kî ye.
65 Û wî got: Ji ber vê yekê min
ji we re got: Heta ku ji aliyê Bav
ve neyê dayîn, tu kes nikare were
cem min!
66 Li ser vê yekê gellek ji şagirtên
wî şunda vegeriyan û êdî bi wî re
nedigeriyan. 67 Wê çaxê Îsa ji
Donzdehan re got: Ma hûn jî di-
xwazin herin? 68 Şîmûn Pêtrûs
bersiv da wî: Ya Xudan, ma em
herin cem kî? Gotinên jiyana
abadîn bi te re ne. 69 Û me jî ba-
werî aniye û dizanin ku, tu Pîrozê
Xwedê yî! 70 Îsa bersiv da wan:
Ma min we Donzdehan nebijart?
Û yekî ji we Îblîs e! 71 Wî vêya
bona Cihûdayê Îsxeryotiyê lawê
Şîmûn got; ji ber ku ew yek ji
Donzdehan bû, yê ku dê Îsa bida
dest, ew bû.

*Bêbaweriya birayên Îsa*

Yû 15,18-19

7 Û piştî vêya Îsa li Celîlê di-
geriya; ji ber, bona Cihûdan
dixwestin ku wî bikujin, wî ne-
xwest li Cihûstanê bigere. 2 Cejna
Cihûdan ya Çardax çêkirinê nêzîk
bû. 3 Û birayên wî jê re gotin: Ji
vê derê derkeve û here Cihûstanê
ku, bila şagirtên te jî karên ku tu
çêdikî bibînin! 4 Ji ber, ew kesê ku
dixwaze xwe bi eşkereyî bide nas
kirin, karê ku çêdike, venaşêre; ger
ku tu van tiştan çêdikî, xwe nîşanî
dinê bide! 5 Ji ber ku birayên wî
jî bawerî bi wî nedianîn. 6 Îsa ji

wan re got: Wexta min hîn neha-
tiye, lê belê bo we wext her dem
li cîh e. 7 Dinya ji we nakeribe, lê
belê ji min dikerihe; ji ber ku ez di
derheqê dinê de şahdeyiyê dikim
ku karên wê xerab in. 8 Hûn herin
vê cejnê; ez hîn naçim vê cejnê; ji
ber ku wexta min hîn temam ne-
bûye. 9 Piştî wî ev tiştên hanê ji
wan re got, li bajarê Celîlê ma.

*Îsa beşdarî Cejnê dibe*

Yû 8,19-24

10 Lê belê dema ku birayên wî çûn
cejnê, ew bi xwe jî wê demê, ne bi
eşkereyî, lê belê mîna ku bi dizîka
be, çû. 11 Cihûdan jî di cejnê de
li wî digeriyan û digotin: Ew li ku
derê ye? 12 Di nav ajawê de di der-
heqê wî de gellek miremir çêbûn.
Hinekan digot: Ew zilamek qenc
e! Hinên din jî digotin: Na, lê belê
ew gel ji rê derdixîne! 13 Lê belê
ji tirsa Cihûdan, kesî di derheqê wî
de nikarîbû bi eşkeretî biaxife.
14 Êdî gava ku bû nêviyê cejnê,
Îsa çû Perestgehê û dest bi hînki-
rinê kir. 15 Û Cihûdan ecêb mabûn
û: Çawa ku tu carî lê nehatiye hîn
kirin, lê ev zilam çawa bi nivîsan
ve dizane? gotin. 16 Îsa bersivê
da wan û got: Hînkariya min ne
ji min, lê ji yê ku ez şandime tê.
17 Ger kesek bixwaze xwestina
wî bîne cîh, ew ê bizanibe, ka ev
hînkarî ya Xwedê ye, an ez ji xwe
dibêjim. 18 Yê ku ji xwe dibêje,
li bilindahiya xwe digere, lê belê
yê ku li bilindahiya kesê ku ew
şandiye digere, rast e û di wî de
neheqî nîne. 19 Ma Mûsa zagonê
neda we? Dîsa jî qet kesek di nav
we de zagonê bi cîh nayne. Çima
hûn bona kuştina min dixebitin?
20 Ajaweyê bersiv da û got: Tu cin-
dar bûyî! Ma kî bona ku te bikuje
dixebite? 21 Îsa bersiv da û ji wan
re got: Min xebatek çêkir û hûn
hemû şaş dibin. 22 Mûsa sunetê da
we (ku, ne ji Mûsa ye, lê ji bapîran
e); hûn roja Sebtê mirovekî sunet
dikin. 23 Bona ku zagona Mûsa
xerab nebe, mirovek roja Sebtê tê
sunet kirin û bona ku min di roja
Sebtê de mirovek bitûmî baş kir,
ma çima hûn bi min re dixeyîdin?
24 Mîna dîtina çavan daraziyê me-
kin, bi rastî daraziyê bikin!

*Ma dibe ku Îsa, Mesîh be?*

Met 16,13-17

25 Wê demê ji mirovên Orşelîmê
hinekan gotin: Ma yê ku bona
kuştina wî dixebitiyan, ne ev e?
26 Û a vay, ew niha bi eşkereyî
diaxife û kesek ji wî re tiştekî
nabêje. Gelo serokan bi rastî fêhm
kirine ku ew Mesîh e? 27 Lê belê
em bi vî zilamî dizanin, ji ku derê
ye; lê belê ger Mesîh were, kes ni-
zane ku ew ji ku derê ve tê.
28 Wê demê Îsa di Perestgehê de
hîn dikir û wî dengê xwe bilind kir
û got: Hûn him min nas dikin û him

jî dizanin ku ez ji ku derê me! Û ez
bi xwe nehatim, lê belê yê ku min
şandiye rastî ye; hûn wî nas nakin.
29 Ez wî nas dikim; ji ber ku ez ji
wî me û wî min şandiye. 30 Li ser
vê yekê wan xwestin ku wî bigirin,
lê belê qet kesekî destê xwe neavêt
ser wî; ji ber ku saeta wî hîn neha-
tibû. 31 Lê belê ji gel pirr kesan
bawerî bi wî anîn û gotin: Dema
ku Mesîh were, ma qey ji yên ku
ev dike, dê hîn jî zêdetir elametan
çêbike? 32 Fêrisiyan bihîstin ku gel
di derbarê Îsa de, van tiştan diaxi-
fin û Serokên kahînan û Fêrisiyan
ji bo girtina wî karmendan şandin.
33 Û Îsa got: Ez hîn demekî kurt
bi we re me û piştî re ez ê biçim
cem yê ku ez şandime. 34 Hûn ê
li min bigerin û hûn min nabînin
û hûn nikarin werin cîhê ku ez lê
me. 35 Ji ber vê yekê Cihûdan ji
hev û din re gotin: Gelo ev mirov
dê bi ku ve biçe ku em nikarin wî
bibînin? Ma ew ê biçe cem yên ku
di nav Grekiyan de belav bûne û
Grekiyan hîn bike? 36 Ev gotina
ku dibêje: Hûn ê li min bigerin û
hûn min nabînin û hûn nikarin we-
rin cîhê ku ez lê me, gelo çî ye?

*Çemên ku avên zindî didin*

Yû 4,10-14; Pey 22,17

37 Di roja dawîn û mezin ya cejnê
de, Îsa rabû ser piyan bang kir û
got: Ger kesek tî bibe, bila were
cem min û vexwe! 38 Mîna ku
Nivîsa Pîroz dibêje, yên ku bawe-
riyê bi min bînin, di hundirê wan
de dê çemên avên zindî biheri-
kin. 39 Lê belê wî ev di derheqê
Ruh de got, yê ku baweriyê bi wî
bînin, dê bistandana; bona ku Ruh
hîn nehatibû dayîn, ji ber ku Îsa
hîn nehatibû bilind kirin.

*Di nava gel de cûdayî*

Lûq 12,51; Yêr 8,8-9

40 Dema ku ji gel hin kesan van
gotinan bihîstin, gotin: Bi rastî ev
ew Peyxamber e. 41 Hin kesan
jî gotin: Ev Mesîh e! Lê belê hin
kesan jî gotin: Çi! Ma Mesîh dê ji
Celîlê bê? 42 Ma Nivîsa Pîroz ne-
gotiye, dê Mesîh ji nîjada Dawid
û ji gundê Beytlehemê ya ku Da-
wid jê ye, were[1]? 43 Bi vî awayî di
nav gel de ji ber Îsa cudayî çêbû.
44 Hin kesan ji wan xwestin ku
wî bigirin, lê belê kesî destê xwe
nedan wî.
45 Di wê navberê de karmend
vegeriyan cem serokên kahînan
û Fêrisiyan; vana ji karmendan
re gotin: Ma we çima wî neanîn?
46 Karmendan bersivê dan: Tu kes
tu carî, mîna vî zilamî negotiye! 47
Fêrisiyan bersivê dan wan: Ma hûn
jî hatin çewt kirin? 48 Ma ji sero-
kan, an ji Fêrisiyan, tu kesek ba-
weriyê bi wî aniye? 49 Lê belê ev
gelê ku zagonê nizane, bi nalet e!

1 (2.Samûyêl 7:12; Mîka 5:2)

50 Nîkodêmûsê ku yekî ji wan bû
û ji berê ve bi şev hatibû cem Îsa, ji
wan re got: 51 Ma zagona me, heta
ku mirovekî guhdarî neke û hînî
tiştên ku ew dike jî nebe, daraziyê
li wî dike? 52 Wan bersiv dan û ji
wî re gotin: An na, ma tu jî ji Celîlê
yî? Lê bigere û binihêre, ji Celîlê
tu peyxamber dernakeve! 53 Û her
kes çû mala xwe.

*Li pîreka ku zinê kiriye tê borîn*

5.Mûs 22,22; Yû 3,17; Rom 2,1-3; 2,17-23

8 Lê belê Îsa çû Çiyayê Zeytûnê.
2 Û serê sibê zû dîsa hate
Perestgehê û hemûya gel hatin
cem wî û ew rûnişt û hînî wan
kir. 3 Alimên zagonê[1] û Fêrisiyan,
pîrekek ku di ser zinê de hatiye gir-
tin anîn û danîn holê 4 û ji Îsa re
gotin: Mamoste, ev pîreka dema zi-
nê dikir, hate girtin. 5 Mûsa di za-
gonê de emir daye[2] me ku yên wu-
sa, bila bêne ecimandin[3], ma tu çi
dibêjî? 6 Wan ji bo wî biceribînin vê
yekê gotin ku, Îsa sucdar derxînin.
Lê belê Îsa xwar bûbû, bi tiliya
xwe, li ser erdê nivîsê dinivîsand.
7 Ji ber ku di jê pirsînê de
domandin, wî xwe rast kir û ji wan
re got: Di nav we de kî bêguneh be,
bila ew pêşiyê kevir bavêje ser wê!
8 Û ew dîsa xwar bû û li ser axê
nivîsê dinivîsand.
9 Dema wan vêya bihîstin, dest pê
kirin ji yên kalepîr û heta yê paşiyê
yek bi yek derketin; Îsa tenê di cîh
de hiştin û Pîrek jî di cihê navber
de sekinî bû. 10 Îsa xwe rast kir
û ji wê re got: Pîrekê, kanê ew
mirovên ku te sûcdar dikirin? Ma
kesî darazî te nekirin? 11 Pîrekê
got: Tu kesî, ya Xudan! Îsa ji wê
re got: Ez jî te daraz nakim; here û
êdî ji niha pê ve gunehan meke!

*Îsa Mesîh – ronahiya dinê ye*

Yû 1,4-5; 1,9-12; 5,36-37; 12,46-50

12 Îsa dîsa bi wan re axifî û got:
Ez ronahiya dinê me; kesê ku li
pey min were, di tariyê de nameşe
û dibe xwediyê ronahiya jiyanê.
13 Fêrisiyan ji wî re gotin: Tu ji bo
xwe şahdeyiyê dikî, şahdeyiya te
rast nîne! 14 Îsa bersiv da û ji wan
re got: Ger ez ji bo xwe şahdeyiyê
bikim jî, dîsa şahdeyiya min rast
e; ji ber ez dizanim ku, ez ji ku
hatim û diçim ku derê; lê belê hûn
nizanin ku ez ji ku hatim û bi ku
ve diçim. 15 Hûn li gor bedenê
darazî dikin; ez daraziyê li tu kesî
nakim. 16 Lê belê ger ez darazi-
yê bikim jî, daraziya min rast e;
ji ber ku ez ne tena serê xwe me,
lê belê ez û Bavê ku min şandiye.
17 Di zagona we de jî hatiye ni-
vîsîn[4] ku şahdeyiya du kesan rast e.

1 Alimên ku Kitêbên Pîroz berhev dikin, şirove dikin û bi kar tînin.
2 (3.Mûsa 20:10; 5.Mûsa 22:22)
3 Bila werin kevir kirinê.
4 (5.Mûsa 17:6; 19:15)

18 Yê ku bo min şahdeyiyê dike,
ez im û Bavê ku ez şandime, ew jî
ji bo min şahdeyiyê dike. 19 Wê
çaxê wan ji wî re gotin: Bavê te li
ku derê ye? Îsa bersiv da: Hûn ne
min nas dikin û ne jî Bavê min.
Ger we min nas bikirana, weyê
Bavê min jî nas bikirana. 20 Îsa
van gotinan dema di Perestgehê
de dida hîn kirin, di xezîneyê de
got û tu kesî jî bi wî negirt; ji ber
ku saeta wî hîn nehatibû.
21 Û wî dîsa ji wan re got: Ez
diçim; hûn ê li min bigerin û hûn
ê di nav gunehên xwe de bimi-
rin; hûn nikarin werin cîhê ku ez
diçimê! 22 Wê çaxê Cihûdan go-
tin: Gelo ma ew ê xwe bikuje ku
dibêje: Hûn nikarin werin cîhê ku
ez diçimê? 23 Û wî ji wan re got:
Hûn ji jêr in, ez ji jor im. Hûn ji vê
dinê ne, ez ne ji vê dinê me. 24 Ji
ber vê yekê min ji we re got: Hûn
ê di nav gunehên xwe de bimirin.
Ger hûn bawer nekin ku ez Ew im,
hûn ê di nav gunehên xwe de bi-
mirin. 25 Wê çaxê jê re gotin: Tu
kî yî? Îsa ji wan re got: Ji we re çi
gotibim, ez tam ew im! 26 Gellek
tiştên min, yên ku bona we bibêjim
û yên ku we daraz bikim hene; lê
belê yê ku min şandiye rast e û
ez tiştê ku ji wî bihîstime, ji dinê
re dibêjim. 27 Wan fêhm nekirin
ku, wî ji wan re ji bona Bav got.
28 Ji bo vê yekê Îsa ji wan re got:
Dema ku hûn Lawê Mirov bilin-
dî jor bikin, wê çaxê hûn ê fêhm
bikin ku, ez ew im û ez bi xwe qet
tiştekî nakim, lê belê Bav çawa
ji min re bêje, ez ûsa dibêjim.
29 Yê ku ez şandime bi min re
ye, wî ez tenê nehiştim; ji ber ku
ez her dem tiştên ku wî xoşnûd
dikin, çêdikim. 30 Dema ku wî
vana axifî, pirr kesan bawerî bi wî
anîn.

*Kesên azad û yên bindest*

1.Yû 1,5-10; 2.Kor 4,3-4; Gal 3,7-29

31 Wê çaxê Îsa ji Cihûdên ku
pê bawerî anîne re got: Ger hûn
di gotinên min de bimînin, bi vî
awayî hûn bi rastî jî şagirtên min
in. 32 Hûn ê bi rastiyê bizanibin
û rastî dê we azad bike! 33 Wan
bersiv dan wî: Em nîjada Birahîm
in û me tu carî ji kesî re koletî ne-
kirine; tu çawa ji me re dibêjî:
Hûn ê bêne azad kirin? 34 Îsa
bersiv da wan: Bi rastî û bi rastî
ez ji we re dibêjim: Hemû kesê
ku guneh dikin ew koleyê gunehê
ne. 35 Kole heta bêdawîbûnê di
mal de namîne, lê belê law her
dem dimîne. 36 Ji bo vê yekê, ger
Law we azad bike, hûn bi rastî
azad dibin. 37 Ez dizanim ku hûn
ji nîjada Birahîm in; lê belê hûn li
kuştina min digerin; ji ber ku hûn
di dilê xwe de cîh nadin gotinên
min. 38 Ez tiştê ku li cem Bavê
xwe dibînim dibêjim; hûn jî tiştê
ku ji bavê xwe dibihîzin dikin.

39 Wan bersiv dan û jê re gotin:
Bavê me Birahîm e! Îsa ji wan
re got: Ger hûn zarokên Birahîm
bûna, weyê karên Birahîm bikirana.
40 Lê belê hûn niha bona min, mi-
rovê ku rastiyê ji Xwedê bihîstiye
dighîne we; bikujin dixebitin; Bi-
rahîm vî tiştî nekir. 41 Hûn karên
bavê xwe dikin! Wan ji wî re gotin:
Em ji zînayê newelidîne! Bavekî
me heye, ew jî Xwedê ye! 42 Îsa
ji wan re got: Ger Xwedê Bavê we
bûya, weyê ji min hez bikirana; ji
ber ku ez ji Xwedê derketim û ha-
tim; ez bi xwe nehatim, lê wî min
şand. 43 Çima hûn van gotinên ku
ez dibêjim, fêhm nakin? Ji ber ku
hûn gotinên min guhdarî nakin!
44 Hûn ji bavê xwe yî Îblîs in û
hûn dixwazin ku xwestina bavê
xwe bikin! Ew ji destpêkê ve qesas
bû û ew di rastiyê de nesekinî; ji
ber ku di wî de rastî tune ye. Dema
ku ew derew dike, ji yê xwe ve
dibêje; ji ber ku ew derewçîn e û
bavê derewan e. 45 Lê belê bona
ku ez rastiyê dibêjim, hûn bawerî
bi min naynin. 46 Di nav we de
kî dikare hebûna guneh di min de
îspat bike? Madem ku ez ji we re
rastiyê dibêjim, hûn çima bawerî
bi min naynin? 47 Yê ku ji Xwedê
ne, ew guh didin gotinên Xwedê; ji
bo vê yekê hûn guh nadin, ji ber ku
hûn ne ji Xwedê ne.

*Lawê Xwedê tê red kirin*

Rom 10,21; K.Şa 7,51; Met 23,37-39;
Îbr 12,3

48 Cihûdan bersiv dan û ji wî re
gotin: Me ji te re got, tu ji Samîri-
yê yî û di te de cin heye, ma go-
tina me ne rast e? 49 Îsa bersiv
da: Di min de cin nîne; lê belê ez
ji Bavê xwe re hurmetê dikim û
hûn jî min nizm dikin. 50 Lê belê
ez li mezinahiya xwe nagerim;
yekî ku digere û daraziyê dike
heye. 51 Bi rastî û bi rastî ez ji
we re dibêjim: Ger mirovek bi
gotina min bigire[1], ew heta bi he-
tayê mirinê nabîne! 52 Cihûdan ji
wî re gotin: Me niha fêhm kirin
ku, di te de cinek heye! Birahîm
mir, peyxamber jî û tu dibêjî: Ger
kesek bi gotina min bigire, heta bi
hetayê mirinê tahm nake! 53 An
tu ji bavê me Birahîm mezintir î?
Ew mir, peyxamber jî mirin; ma
tu dibêje qey tu kî yî?
54 Îsa bersiv da: Ger ez xwe bilind
bikim, bilindahiya min ne tiştek e;
yê ku min bilind dike, Bavê min
e; hûn dibêjin: Ew Xwedayê me
ye. 55 Û hûn wî nas nakin; lê belê
ez wî nas dikim û ger ez bêjim: Ez
wî nas nakim! wê çaxê ez jî mîna
we derewîn dibim; lê belê ez wî
nas dikim û bi gotina wî ve digi-
rim. 56 Bavê we Birahîm bona ku
ew roja min bibîne bi kêfxweşiyê
coşiya; wî ew dît û dilgeş bû.
57 Bo vê yekê Cihûdan ji wî re

1 Gotina min biparêze, an jî: Li gor gotina min bike.

gotin: Tu hîn pêncî salî nîne; ma te Birahîm jî dîtiye? 58 Îsa ji wan re got: Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Ji berî ku Birahîm hebe ez heme! 59 Wê çaxê bona ku Îsa bidin ber keviran wan ji erdê kevir rakirin, lê belê Îsa xwe veşart û ji Perestgehê ve derket.

*Îsa çavên miroveki kor vedike*

Îşa 35,5; 42,7; Male 3,20; 2.Kor 4,6

9 Û dema ku ew derbas dibû, miroveki ku ji bûyîna xwe ve kor e dît. 2 Şagirtên wî jê pirs kirin û gotin: Rebbî, ji bo ku ev zilam kor welidiye kî guneh kir; wî, an jî dayik û bavê wî? 3 Îsa bersiv da: Ne wî guneh kir, ne jî dayik û bavê wî; lê bona ku karên Xwedê li ser wî daxuyanî bibin, ew çêbûye! 4 Divê hîn ku roj e ez karên yê ku ez şandime bikim; şev tê, wê çaxê tu kes nikare kar bike. 5 Heta ku ez di dinê de me, ez ronahiya dinê me. 6 Piştî ku wî van tiştan got, tûyî erdê kir, bi tûka xwe heriyê çêkir û wê heriyê di çavên wî da 7 û ji wî re got: Here, di burka[1] Şîloamê (ku bi navê: Hatiye Şandin, tête wergerandin) de xwe bişo! Ew jî çû xwe şuşt û çavê wî vebû û bi vî awayî vegeriya hat.

8 Wê demê cînarê wî û ew kesên ku dîtibûn ew berê parsek bû, gotin: Ma viya ne ew mirovê ku rûdinişt û parsê dikire yî? 9 Hinan gotin: Erê, ew e! hinekan gotin: Na, ew nîne, lê belê mîna wî ye! Wî bi xwe got: Ez im! 10 Wê çaxê wan jê re gotin: Ma çavê te çawa vebûn? 11 Wî bersiv da û got: Ew mirovê ku navê wî Îsa ye, wî heriyê çêkir û di çavê min ve da û ji min re got: Here, di burka Şîloamê de xwe bişo! Lê gava ez çûm li wê derê û min xwe şuşt, çavên min vebûn. 12 Wan ji wî re gotin: Ew li ku ye? Wî got: Ez nizanim!

*Fêrisî dest bi lêkolînê dikin*

Met 23,13; Yû 10,37-38

13 Ew mirovê ku berê kor bû, birin cem Fêrisiyan. 14 Roja ku Îsa herî çêkir û çavên wî vekirin, roja Sebtê bû. 15 Fêrisiyan jî dîsa ji wî pirs kirin û gotin, çavên te çawa vebûn? Wî jî ji wan re got: Wî herî di çavên min ve da, min jî xwe şuşt û niha dibînim! 16 Ji ber vê yekê ji Fêrisiyan hin kesan gotin: Ev mirov ne ji Xwedê ye; ji ber ku ew bi roja Sebtê ve nagire! Hinên din jî gotin: Gunehkarek çawa dikare ku mûcîzeyên ûsa çêbike? Û di navbera wan de cudayî çêbû. 17 Wan dîsa ji mirovê kor re gotin: Tu ji bo wî mirovê ku çavên te vekirine, çi dibêjî? Wî jî got: Ew peyxamber e!

18 Cihûdan heta ku bangî dayik û bavê wî mirovê ku berê kor bû

[1] Hewz.

nekirin, bawer nekirin ku ew berê
kor bû û niha çavên wî vebûne.
19 Û ji wan pirs kirin û gotin: Ma
lawê we yê ku hûn dibêjin kor
welidiye, ev e? Ger wisa be, ma
niha ew çawa dibîne? 20 Dayik û
bavê wî bersiv dan wan û gotin:
Em zanin ku ev lawê me ye û kor
welidiye; 21 lê belê em nizanin
ku ew niha çawa dibîne, an jî kî
çavên wî vekirine em nizanin; jê
pirs bikin. Ew mezin e, ji bo xwe
bila ew biaxife! 22 Dayik û bavê
wî ji Cihûdan ditirsiyan, bo vê
yekê wan ûsa got; ji ber ku Cihû-
dan di nav xwe de biryarê dabûn
ku, kî bi eşkereyî bibêje ew Mesîh
e, ew ê wan ji kenîştê bavêjin.
23 Bo vê yekê dayik û bavê wî
gotin: Ew mezin e, ji wî bipirsin!
24 Li ser vêya wan cara du-
wemîn bangî mirovê ku berê kor
bû kirin û jê re gotin: Şikiryê ji
Xwedê re bike! Em dizanin ku
ev zilamekî gunehkar e. 25 Wî jî
bersiv da û got: Ew gunehkar e
an jî ne gunehkar e, ez nizanim.
Ez tiştekî dizanim: Ez kor bûm û
niha dibînim! 26 Wê çaxê ji wî re
gotin: Wî ji te re çi kir? Wî çavên
te çawa vekir? 27 Wî bersiv da
wan: Min niha ji we re got û we
guhdarî nekirin; çima hûn dixwa-
zin vêya dîsa bibihîzin? An hûn
jî dixwazin bibin şagirtên wî?
28 Wan ji wî re kufrê kirin û go-
tin: Tu şagirtê wî yî! Lê belê em
şagirtên Mûsa ne. 29 Em dizanin
ku Xwedê ji Mûsa re gotiye; lê
belê em nizanin ku ev mirov ji
ku ve hatiye. 30 Mirov bersiv da
wan û ji wan re got: Ev e tiştê ku
mirov şaş dike, hûn nizanin ew ji
ku ve hatiye, lê belê wî çavên min
vekirin! 31 Em dizanin ku Xwedê
guh nade kesên gunehkar; lê belê
ger kesek ji Xwedê re peristinê
bike û xwestina wî bîne cîh, ew
guh dide wî. 32 Ji demên bêpêşî
ve hîn kesî nebihîstiye ku, tu kesî
çavên mirovekî ku kor welidiye,
vekiriye. 33 Ger ev mirov ne ji
Xwedê bûya, wî nikarîbû ku tu
tiştekî çêbike! 34 Wan bersiv dan
û ji wî re gotin: Tu ji ser û pê di
nav gunehan de bûyiye, ma tuyê
hînî me bikî? Û wan wî avêtin
derve.

*Yên kor dibînin û yên dibînin jî kor dibin*

Lûq 10,21; 2.Kor 4,3-6; Îşa 6,9-10; Met 15,14

35 Îsa bihîst ku wan wî avêtine
derve û gava wî ew dît jê re got:
Tu baweriyê bi Lawê Mirov[1] tînî?
36 Wî bersiv da û got: Ya Xudan,
kî ye ku, ez baweriyê bi wî bînim?
37 Îsa ji wî re got: Him te wî dît û
him jî yê ku bi te re diaxife, ew e!

1 Di gellek nivîsên kevin de Lawê Xwedê hatiye nivîsandin.

38 Û wî got: Ya Xudan, ez bawer
dikim! û ji wî re secde kir.
39 Îsa jî got: Ez hatim, bila yên
ku kor in, bibînin û yên ku ne kor
in jî kor bibin; ez ji bo darazki-
rinê hatim vê dinê. 40 Hin kesên
Fêrisî yên li cem wî bûn, dema ku
ev bihîstin, jê re gotin: Ma em jî
kor in? 41 Îsa ji wan re got: Ger
hûn kor bûna, gunehên we dê tu-
nebûya; lê belê niha hûn dibêjin:
Em dibînin, bo vê yekê gunehê
we dimîne[1]!

*Şivanê qenc*

Hêz 34,1-19; Îşa 40,11; Zeb 23;
1.Pêt 2,24-25; 5,4

10 Bi rastî û bi rastî ez ji we
re dibêjim: Yê ku di derî re
naçe hewşa mîhan û ji rêke din
re dikevê diz û rêbir e. 2 Lê belê
yê ku di derî re diçe hundir, ew
şivanê mîhan e. 3 Dergevan ji wî
re derî vedike û mîh dengê wî di-
bihîzin; ew jî bi navê wan bangî
mîhê xwe dike û wan dibe derve.
4 Dema ku wî hemû mîhên xwe
derxist derve, ew di pêşiya wan
de diçe û mîh li pey wî diçin; ji
ber ku ew dengê wî nas dikin. 5 Û
li pey yekî xerîb naçin, lê belê ji
ber wî direvin; ji ber ku dengê
xerîban nas nakin. 6 Îsa ji wan re
vê wekokê got, lê belê wan fêhm
nekirin ku, ew ji wan re çi dibêje.
7 Û li ser vê yekê Îsa ji wan re
dîsa got: Bi rastî û bi rastî ez ji we
re dibêjim: Ez deriyê mîha me.
8 Hemûyên ku berî min hatine,
diz û rêbir in, lê belê mîhan guh
nedan wan. 9 Ez derî me. Ger
kesek di min de bikeve hundir,
xelas dibe; dikeve hundir, der-
dikeve û çêregeh dibîne. 10 Diz
tenê ji bo diziyê, kuştînê û qeli-
handinê tê. Ez bona ku di wan de
jiyan hebe û gellekî jiyan hebe
hatim. 11 Ez şivanê qenc im;
şivanê qenc di oxra mîhê xwe de
canê xwe dide. 12 Ew mirovê ku
şivan û xwediyê mîhan nîne yê bi
heqdest, dema ku ew hatina gur
bibîne, ji ber ku mîh ne yên wî ne,
wan berdide û direve, diçe; gur jî
bi wan digire û belav dike. 13 Ew
direve, ji ber ku ew bi heqdest e
û bona mîhan xem nake. 14 Ez
şivanê qenc im û ez yên xwe nas
dikim. 15 Çawa Bav min nas dike
û ez jî Bav nas dikim, yên min jî
ûsa min nas dikin û ez ji bo mîhan
canê xwe didim. 16 Û hin mîhên
min ê din jî hene, ew daxilê vê
hewşê nîn in; divê ez wan jî bî-
nim; dê ew ê dengê min bibihîzin
û bibin şivanek û keriyek. 17 Ji
ber vê yekê Bav ji min hez dike, ji
ber ku ez canê xwe didim, da ku,
ez wî dîsa bigirim. 18 Tu kes ni-
kare wî ji min bigire; lê belê ez wî
bi xwe û xwe didim. Ji bo dayîna
wî qudreta min heye û ji bo dîsa

[1] Disekine.

girtina wî qudreta min heye. Min
vî emrî ji Bavê xwe ve girt.
19 Ji ber van gotinan dîsa di nav
Cihûdan de cudayî çêbû. 20 Û
di nav wan de gellekan gotin: Di
wî de cin heye, ew dîn e; ma hûn
çima wî guhdarî dikin? 21 Hinên
din gotin: Ev gotinên hanê, yên
mirovê cindar nîn in. Ma cin di-
kare ku çavê koran veke?
22 Di wê demê de li Orşelîmê,
bo bîranîna vebûna Perestgehê
cejn hebû û zivistan bû. 23 Û Îsa
di hundirê Perestgehê de, di ey-
wana Silêman de digeriya. 24 Û
Cihûdan dora wî girtin û ji wî re
gotin: Ma tuyê heta kengê dilê me
di şikê de bihêlî? Ger tu Mesîh
î, ji me re bi eşkereyî bibêje!
25 Îsa bersiv da wan: Min ji we re
got û hûn bawer nakin. Xebatên
ku min bi navê Bavê xwe kirin,
ew ji bo min şahdeyiyê dikin.
26 Lê belê hûn bawer nakin; ji
ber ku hûn ne ji mîhên min in.
27 Mîhên min dengê min dibihî-
zin û ez jî wan nas dikim û ew li
pey min tên 28 û ez jiyana abadîn
didim wan û ew abadîn helaq na-
bin û tu kes nikare wan ji destê
min derxîne. 29 Bavê min, yê ku
ew dane min, ji hemûyan mezin-
tir e û hêza tu kesî nikare wan ji
destê Bav derxîne. 30 Ez û Bav
yek in.

*Bêbawerî û berxwedan zêde dibe*

Yû 8,51-59; 14,9-11

31 Cihûdan dîsa ji erdê kevir raki-
rin û xwestin ku wî bidin ber ke-
viran. 32 Îsa bersiv da wan: Min
ji Bav gellek xebatên qenc, nîşanî
we dan; ma hûn ji bo kîjan xebatê
min kevir dikin?
33 Cihûdan bersivê dan wî û go-
tin: Em ne bona xebatekî qenc,
bona ku te kufrê kiriye, tu jî mi-
rov î, lê belê tu dibêjî ku ez Xwe-
dê me; te didin ber keviran. 34 Îsa
bersiv da wan: Ma di zagona we
de nehatiye nivîsandin; min got:
Hûn îlah in[1]? 35 Xwedê gotina
xwe ji kê re şandiye, ji wan re
îlah tê gotin û Nivîsa Pîroz jî xe-
rab nabe. 36 Bav min pîroz kir û
şand dinê. Wê çaxê bona ku min
got: Ez Lawê Xwedê me, hûn
çawa ji min re dibêjin ku te kufrê
kir? 37 Ger ez xebata Bavê xwe
nekim, baweriyê bi min neynin.
38 Lê belê ger ez dikim û hûn
naxwazin, baweriyê bi min bînin,
balê baweriyê bi xebatên ku ez
dikim bînin, da ku, hûn bizanibin
û fêhm bikin ku Bav di min de ye
û ez jî di Bav de me!
39 Wan dîsa xwestin ku wî bigi-
rin, lê belê ew ji destê wan derket.
40 Îsa dîsa çû wêdatira Urdunê[2],
cîhê ku Yehya berê li wir vaftîz
dikir û li wê derê ma. 41 Pirr kes

1 Zebûr 82:6

2 Şerîayê.

hatin cem wî û gotin: Bi rastî
Yehya qet mûcîzetan çênekir; lê
belê tiştên ku Yehya ji bo wî got,
ew hemû rast derketin! 42 Û li wê
derê pirr kesî bawerî bi wî anîn!

*Mirin û vejandina Lazar*

Yû 5,20-29; 1.Kor 15,20-27.54

11 Li Beytanyayê, ji gun-
dê Meryem û xwuşka wê
Martayê, zilamek bi navê La-
zar nexweş ketibû. 2 Lazarê
nexweş, birayê Meryema ku, rûnê
bêhnxweş di Xudan de dabû û bi
porê xwe jî lingê wî paqij kiribû
bû. 3 Wê demê herdu xwuşkan,
agahiyê ji Îsa re şandin û gotin:
Ya Xudan, a vay, yê ku tu jê hez
dikî, nexweş e! 4 Dema Îsa vêya
bihîst, got: Ev nexweşiya ne ji bo
mirinê ye; lê belê bona ku Lawê
Xwedê bi vêya bête bilind kirin,
ji bo bilindahiya Xwedê ye! 5 Îsa
ji Marta, ji xwuşka wê Meryem
û ji birayê wan Lazar hez dikir.
6 Û gava wî bihîst ku ew nexweş
e, hîn du rojên din li cîhê ku ew lê
bû, ma.
7 Pişt re ji şagirtên xwe re got: Em
dîsa herin Cihûstanê! 8 Şagirtan ji
wî re gotin: Rebbî, niha Cihûdan
bona ku te bidin ber keviran di-
biliyan; ma tu dîsa diçî wê derê?
9 Îsa bersivê da: Ma rojek ne donz-
deh saet e? Ger mirov rojê bigere,
tilpekî nabe; ji ber ku ronahiya vê
dinê dibîne. 10 Lê belê yê ku şevê
bigere, tilpekî dibe; ji ber ku ronahî
di wî de nîne. 11 Piştî vê axaftinê,
wî ji wan re got: Hevalê me Lazar
bi xew ve çûye; lê belê ez diçim
ku wî hişyar bikim. 12 Şagirtan ji
wî re gotin: Ya Xudan, ger ew bi
xew ve çûbe, dê baş bibe! 13 Îsa
vêya ji bo mirina wî gotibû, lê belê
wan gotin ku, qey ew ji bo xew de
çûnê dibêje. 14 Wê çaxê Îsa ji wan
re bi eşkereyî got: Lazar miriye.
15 Û bona ku hûn bawer bikin, ji
bo we kêfxweş im ku, ez ne li wê
derê bûm. Lê belê bihêlin em biçin
cem wî! 16 Şagirt Tûmas, yê ku jê
re digotin: Cot[1]ji hevalên xwe re
got: Em jî bona ku, bi wî re bimi-
rin; biçin!
17 Dema Îsa gîhaşt wê derê; Lazar
çar roj e di gorê de raketî dît. 18 Û
Beytanya qasî avêtina panzdeh tîrî
nêzîkî Orşelîmê bû. 19 Gellekan
ji Cihûdan ji bo ku bona birayên
wan xemrevîniyê li wan bikin
hatibûn cem Marta û Meryemê.
20 Dema ku Marta hatina Îsa
bihîst, bona pêrgîniya wî derket;
lê belê Meryem li malê rûniştîbû.
21 Marta ji Îsa re got: Ya Xudan,
ger tu li vir bûya, birayê min
nedimir! 22 Ez niha jî dizanim ku,
tu ji Xwedê çi bixwazî, ew ê bide te.
23 Îsa ji wê re got: Dê birayê te
biveje! 24 Martayê jê re got: Ez
dizanim ku, di roja dawiyê de, dê di

[1] Dîdîmos.

vejînê de biveje. 25 Îsa ji wê re got:
Vejîn û jiyan ez im; yê ku baweriyê
bi min bîne, ew bimire jî dê dîsa
bijî 26 û her kesê ku dijî û baweriyê
bi min tîne, abadîn namire. Tu
baweriyê bi vêya tînî? 27 Wê ji wî
re got: Belê, ya Xudan; min bawerî
anî ku tu Lawê Xwedê yê ku were
dinê, Mesîh î. 28 Û piştî ku wê vêya
got, çû û bi dizîka bangî xwuşka
xwe Meryemê kir û got: Mamoste li
vê derê ye û bangî te dike! 29 Dema
wê vêya bihîst, zû rabû û çû cem
Îsa. 30 Îsa hîn negîhaştibû gund û
hîn li cîhê ku, Marta pêrgîniyê jê re
kiriye, sekinîbû. 31 Cihûdên ku tevî
wê di malê de bûn û xemrevînî li
wê dikirin, dema dîtin ku Meryem
bi lezî derket derve; wan gotin ew
diçe ser gora birayê xwe û dê li wir
bigirî û li pey wê çûn.
32 Lê belê gava Meryem gîhaşt
cîhê ku Îsa lê sekiniye, wî dît û
xwe avêt lingê wî û got: Ya Xu-
dan, ger tu li vir bûya, birayê min
nedimir! 33 Dema Îsa, wê û ew
Cihûdên bi wê re hatine digirîn,
dît, di ruhê xwe de naliya û dilê
wî zehf xemgîn bû 34 û got: We
wî kirin ku derê? Wan ji wî re
gotin: Ya Xudan, were û bibîne!
35 Îsa giriya. 36 Cihûdan go-
tin: Binihêre, çiqasî jê hez dikir!
37 Lê belê ji wan hin kesan gotin:
Yê ku çavên koran vekiriye, ma
nikarîbû tiştekî bike ku, ev miro-
va jî nemire?
38 Wê demê Îsa dîsa di hundirê
xwe de kûr naliya û hate gorê. Ew
şikeftek bû û kevirekî danîbûn ber
wê. 39 Îsa got: Kevir rakin! Mar-
taya xwuşka yê mirî, ji wî re got:
Ya Xudan, êdî bêhn ketiye wî, ji
ber, ew çar roj e ku li vir e! 40 Îsa
ji wê re got: Ma qey min ji te re
negot: Ger ku tu bawer bikî, tuyê
bilindahiya Xwedê bibînî? 41 Li
ser vê yekê wan kevir rakirin. Îsa
jî çavên xwe ber ve jor rakir û got:
Ya Bavo, bona ku te min bihîst, ez
ji te re şikir dikim. 42 Û ez dizanim
ku tu her dem min dibihîzî; lê belê
min vêya bona van mirovê li vê
derê ne got, da ku, bila ew bawe-
riyê bînin, te min şandiye. 43 Piştî
ku wî vêya got, bi dengê bilind:
Lazar were derve! qêriya. 44 Mirî
jî, dest û lingên wî bi potikan ve
pêçandî û rûyê wî bi destmalê ve
girtî derket derve. Îsa ji wan re got:
Wî vekin û berdin bila here!
45 Wê demê ew Cihûdên ku ha-
tibûn cem Meryemê, gava xebata
ku Îsa çêkir, dîtin, ji wan gellekan
bawerî bi wî anîn. 46 Lê belê ji wan
hinekan çûn cem Fêrisiyan û karên
ku Îsa çêkirine, ji wan re gotin.

### *Civata Netewî bona kuştina Îsa dixebite*

Lûq 16,31; Zeb 71,10; Lûq 20,13-15

47 Li ser vê yekê serokên kahînan
û Fêrisiyan Civata Netewî civan-
din û gotin: Ma em çi bikin? Ji ber

ku ev mirov pirr mûcîzeyan çêdi-
ke! 48 Ger em wî wusa bihêlin,
dê her kes baweriyê bi wî bînin û
Romayî jî dê werin him cîhê me
û him jî gelê me ji navendê rakin!
49 Û yekî ji wan, Serokkahînê wê
salê Qayafa, ji wan re got: Hûn
qet tiştekî fêhm nakin 50 û hûn
nafikirin, bona ku hemûya welat
tune nebe, mirovek di oxra gel
de bimire, ji bo me çêtir e! 51 Wî
vêya bi serê xwe negot; lê belê ji
bo ku wê salê ew Serokkahîn bû,
peyxambertî kiribû ku dê Îsa ji bo
gel bimire 52 û ne tenê ji bo gel, lê
belê ji bo yekîtî û civandina hemû
zarokên Xwedê yên ku belav bûne
jî. 53 Û ji wê rojê pê ve, bona ku
wî bikujin, dest bi ava kirina du-
zenê kirin. 54 Ji bo vê yekê êdî
Îsa di nav Cihûdan de bi eşkereyî
negeriya; lê ew ji wir veqetiya û
çû nêzîkî çolê, navçeya ku jê re
dibêjin Efraîm û tevî şagirtên xwe
li wê derê ma.
55 Fisiha Cihûdan nêzîk bû. Û
ji hemûya welêt gellek kes, ji
bona xwe safî bikin, berî Fisihê
hilkişiyan Orşelîmê. 56 Ew li wê
derê, li Îsa digeriyan û dema ew
di Perestgehê de sekinî bûn, ji hev
û din re digotin: Hûn çi dibêjin?
Gelo dê ew neyê cejnê?
57 Serokên kahînan bi Fêrisiyan
re bona ku bi wî bigirin, bi gotina;
ger kesek bizanibe ew li ku derê
ye bila nîşan bide, emirek dabûn.

*Wekoka dilsoziya rasteqîn*

Met 26,6-13; Marq 14,3-9

12 Şeş roj berî Fisihê, Îsa hat
Beytanyayê, Lazarê ku wî
ji nav miriyan vejandî bû li wir
bû. 2 Li wê derê ji bo wî ziyafetek
çêkirin; Martayê jî xizmetê dikir.
Yên ku bi Îsa re li sifrê rûniştibûn
yek ji wan Lazar bû. 3 Meryemê
nîv lîtir[1] rûnê pirr biqîmet, ji rûnê
nardînê[2] yê safî anî û di lingê Îsa
de da û bi porê xwe lingê wî paqij
kir; ew mal bi bêhna rûn ve tijî
bû. 4 Lê belê şagirtek ji şagirtan,
yê ku dê paşê Îsa bide dest, Cihû-
dayê Îsxeryotî got: 5 Ma çima ev
rûn bi sê sed dînarî nehat firotin û
nedan feqîran? 6 Vêya jî ne ji bo
ku feqîran bi ser re digire; lê bona
ku diz bû û bona kîsik bi wî re bû
û yê ku di hundirê wê de ye didi-
ziya, got. 7 Wê demê Îsa got: Dev
ji wê berde! Bila vêya bo roja ku
min dikin gorê hilîne. 8 Ji ber ku
feqîr her dem bi we re ne, lê belê
ez her dem ne bi we re me.
9 Ajaweyeke mezin ya ji Cihûdan,
bihîstin ku Îsa li wê derê ye û tenê
ne ji bo Îsa, lê ji bo Lazarê ku wî ji
mirinê ve rakiribû jî bibînin hatin.
10 Serokên kahînan di nav hev de
şêwira kuştina Lazar jî kirin; 11 ji

[1] Li rasteka menan binêrin.

[2] Rûnê simbila Hindîstanê.

ber ku bona wî pirr Cihûd diçûn û bawerî bi Îsa dianîn.

*Îsa diçe Orşelîmê*

Met 21,1-11; Marq 11,1-11; Lûq 19,29-44

12 Dotira rojê, ajaweyeke mezin yên hatibûn cejnê, dema hatina Îsa ya Orşelîmê bihîstin; 13 guliyê xurme rahiştin û bona pêrgîniya wî çûn û qêriyan: Hozana[1]! Yê ku bi navê Xudan tê, Qiralê Îsraêlê pîroz be! 14 Îsa, dehşikek dît û lê siwar bû; mîna ku hatiye nivîsandin: 15 Metirse, ya keça Siyonê! A vay, Qiralê te li dehşikekê kerê siwar bûye û tê[2]. 16 Şagirtên wî di destpêkê de van tiştan fêhm nekirin; lê belê wexta ku Îsa hat bilind kirin, wan vê yekê anîn bîra xwe ku ew tişt ji bo wî hatine nivîsandin û wan vêya ji bo wî çêkirin. 17 Ew gelê ku dema wî bangî Lazar kir û ew ji mirinê rakir li wê, li cem wî bûn, wan şahdeyiyê dikir. 18 Ji ber vê yekê gel jî berbi wî ve çû; ji ber, wan bihîstibû ku wî vê nîşanê çêkiriye. 19 Ji bo vê yekê Fêrisiyan ji hev û din re gotin: Hûn dibînin; ji destê we qet tiştek nayê; a vay, hemûya dinê li pey wî diçe!

20 Di cejnê de, di nav yên ku bo peristinê hilkişiyabûn Orşelîmê de, hin kesên Grekî jî hebûn. 21 Vana hatin cem Fîlîpûs, ew ji Beytsaydaya ku bajarê Celîlê ye, bû, ji wî rica kirin û gotin: Efendî, em dixwazin ku Îsa bibînin! 22 Fîlîpûs hat û ji Andrêyas re got; Andrêyas û Fîlîpûs jî hatin û ji Îsa re gotin.

*Îsa Mesîh daxuyaniya mirina xwe dike*

Lûq 9,21-25; Îbr 2,9-10

23 Îsa bersiv da wan û got: Saeta ku Lawê Mirov bête bilind kirin hat! 24 Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Heta ku tena genim nekeve nav erdê û nemire, ew ê tena serê xwe bimîne; lê belê ger bimire, dê gellek zad bide. 25 Yê ku ji canê xwe hez bike, wî winda dike; lê belê yê ku di vê dinê de ji canê xwe dikerihe, wê ji bo jiyana abadîn hiltîne. 26 Ger kesek bixwaze xizmetê ji min re bike, bila li pey min were; ez li ku derê bim, dê xizmetkarê min jî li wê derê be; ger kesek ji min re xizmetê bike, dê Bav rûmetê bide wî. 27 Niha canê min zehf teng dibe û ma ez çi bibêjim? Bibêjim, Bavo, min ji vê saetê xelas bike? Lê belê ez ji bo vê yekê hatime vê saetê. 28 Bavo; navê xwe bilind bike! Li ser vê yekê ji jor ve dengek hat: Min ew bilind kir û ez ê wî dîsa bilind bikim!

29 Ew gelê ku li wê derê bûn û ajaweya ku vêya bihîstin, digotin: Ezman guregur kir. Hine-

1 Di maneya: Ji kerema xwe ji me re bike de ye.

2 Zekerya 9:9

kan jî digotin: Milyaketekê pê
re axifî! 30 Îsa bersiv da û got:
Ev denga ne ji bo min, lê ji bo
we hat. 31 Daraziya vê dinê niha
ye. Dê serokê vê dinê niha bête
avêtinî derve. 32 Û dema ku ez ji
erdê ve bilind bibim, ez ê hemû
kesî berbi xwe ve bikişînim.
33 Îsa vêya ji bo ka ew ê bi miri-
nek çawa bimire got. 34 Ajaweyê
bersivê da wî: Me ji zagonê ve bi
gotina, dê Mesîh heta abadînê
bimîne, bihîstin û çawa dibe ku
tu dibêjî: Divê Lawê Mirov bête
bilind kirin? Ev Lawê Mirov kî
ye? 35 Îsa ji wan re got: Ronahî
hîn demeke kurt di nav we de
ye. Dema hîn ronahiya we heye
bimeşin ku, bila tarî ser we ne-
gire[1]! Ji ber ku yê di tariyê de
dimeşe, nizane ku bi ku ve diçe.
36 Heta ku ronahiya we heye, ba-
weriyê bi ronahiyê bînin, da ku,
hûn bibin zarokên ronahiyê. Piştî
ku Îsa ev tiştên hanê gotin; çû û
xwe ji wan veşart.

*Bêbaweriya mirovan*

Îşa 6,9-10; Îbr 3,7-8; 5.Mûs 18-19

37 Lê belê wî li ber çavê wan
ewqas mûcîzeyan çêkir, wan dîsa
jî bawerî bi wî nedianîn; 38 da ku,
gotina Îşaya peyxamber, ya ku
dibêje: Ya Xudan, ma kê bi vê aga-
hiya ku me daye, bawer kir? Û ma
hêza[2] Xudan ji kê re hate daxuyanî
kirin? were cîh, çêbûn.
39 Ji bo vê yekê wan nikarîbûn
baweriyê bianiyan; ji ber ku Îşaya
dîsa gotiye: 40 Wî çavên wan kor
kir û dilên wan hişk kir ku, bila
çavên wan nebîne û dilên wan jî
fêhm neke û ew venegerin û ez
jî wan baş nekim[3]. 41 Îşaya vana
gotiye, ji ber ku wî bilindahiya
Îsa dîtiye û bo wî axifiye. 42 Lê
tevî vêya ji serokan gellekan jî
bawerî bi wî anîn; lê belê bona ku
ji keniştê neyên qewirandin, ji ber
Fêrisiyan mikur nehatin. 43 Ji ber
ku wan ji pesnê Xwedê zêdetir, ji
pesnê mirovan hez kirin.
44 Îsa bang kir û got: Yê ku ba-
werî bi min tîne, ne bi min, lê bi
yê ku min şandiye baweriyê tîne.
45 Û yê ku min dibîne, yê ku min
şandiye dibîne. 46 Bona kesê ku
bawerî bi min tîne, di tariyê de
nemîne, ez bi ronahîtî hatim dinê.
47 Û ger zilamek gotinên min di-
bihîze û pê nagire, ez daraziyê li
wî nakim; ji ber ku ez bona da-
razîkirina dinê nehatime, lê bona
xelasiya dinê hatime. 48 Yekî dinî
daraziyê li yê ku min red dike û
guh nade gotinên min, dike heye;
gotina ku gotime, di roja dawiyê
de dê daraziyê li wî bike. 49 Ji ber

[1] Bila tarî di ser we de negire, an jî: Neyê.
[2] An jî: Bazûya wî ya xwurt. Îşaya 53:1
[3] An jî: Şifê nedim wan. Îşaya 6:10

ku ez bi xwe neaxifîm; lê Bavê
min yê ku min şand emir da min,
ka ez ê çawa biaxifim û çi bibêjim.
50 Û ez dizanim ku, emrê wî ji-
yana abadîn e. Ji ber vê yekê tiştên
ku ez dibêjim, çawa ku Bav ji min
re gotiye, wusa dibêjim.

*Îsa lingên Şagirtên xwe dişo*

Met 26,19-20; Marq 10,43-45; 14,17;
Lûq 22,14-18; 22,24-27

13 Lê belê berî Cejna Fisihê,
Îsa dizanîbû saeta wî ya ku
ji vê dinê veqete û here cem Bav
hatiye; wî ji yên ku di dinê de ên
wî ne, hez kiribû û heta dawiyê ji
wan hez kir. 2 Di dema xwarina
êvarê de, Îblîs xwestina xwe ki-
ribû dilê Cihûdayê Îsxeryotiyê
lawê Şîmûn ku, ew wî bide dest.
3 Îsa zanîbû ku Bav her tiştî daye
destê wî û ew ji cem Xwedê hati-
ye û dê dîsa vegere cem Xwedê.
4 Ew ji xwarinê rabû, ser kincê
xwe danî aliyekî û pêşgîrek girt
li pişta xwe pêça. 5 Pişt re av kir
leganê û lingê şagirtên xwe şuştin
û dest pê kir bi pêşgîra ku dabû
pişta xwe lingên wan ziwa kirin.
6 Ew hat cem Şîmûn Pêtrûs û wî
ji Îsa re got: Ya Xudan, ma tuyê
lingên min bişo? 7 Îsa bersiv da
û ji wî re got: Ez çi dikim tu niha
fêhm nakî, lê belê pişt re tuyê
fêhm bikî.
8 Pêtrûs jê re got: Tu carî tuyê
lingên min neşo! Îsa bi gotina: Ger
ez te neşom, para te bi min re nabe
bersivê da. 9 Şîmûn Pêtrûs jê re got:
Ya Xudan, tenê ne lingên min, lê
belê dest û serê min jî bişo! 10 Îsa ji
wî re got: Yê ku hatiye şuştin, xeynî
lingên wî hewce nîne ku tu derekî
wî yî din were şuştin; lê belê bitûmî
paqij e; hûn jî paqij in, lê belê ne
hemûyên we. 11 Ji ber, wî bi yê ku
dê wî bide dest dizanîbû; ji bo vê
yekê got: Hemûyên we ne paqij in.
12 Bi vî awayî piştî ku wî lingên
wan şuşt û kincê xwe rahişt, dema
dîsa li sifrê rûnişt; ji wan re got:
Ma hûn bi tiştên ku min ji we re
kirine, fêhm dikin? 13 Hûn ji min
re Mamoste û Xudan dibêjin û hûn
rast dibêjin, ji ber ku ez ew im.
14 Madem ku ez Xudan û Ma-
moste me û dîsa jî min lingên we
şuştin; hewce dike ku hûn jî lingên
hev û din bişon. 15 Ji ber, bona ku
min ji we re kir, hûn jî bikin, vê
wekokê dam we. 16 Bi rastî û bi
rastî ez ji we re dibêjim: Kole ji
efendiyê xwe ne mezintir e; yê ku
hatiye şandin jî ji yê ku wî şandiye
ve ne mezintir e. 17 Madem ku
hûn bi van tiştan dizanin, ger hûn
wan bikin, hûn ê dilşad bibin!

*Îsa daxuyaniya girtina xwe dike*

Met 26,20-25; Marq 14,17-21;
Lûq 22,21-23

18 Ez ji bo we hemûyan nabêjim,
ez bi yên ku min bijartine diza-
nim; lê belê bona Nivîsa Pîroz ya

ku dibêje: Yê ku nanê min xwar, pahniyê xwe li min bilind kir[1], bête cîh e. 19 Ez ji we re vana berî ku bibin, ji niha ve dibêjim ku, hûn baweriyê bînin ku, ez ew im. 20 Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Kesê ku yê ez dişînim qebûl bike, min qebûl dike û yê ku min qebûl dike, ew yê ku min şandiye qebûl dike.

21 Îsa li pey gotina van tiştan, di ruh de gellek teng bû û wî şahdeyiyê kir û got: Bi rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim: Dê yek ji we, min bide dest! 22 Şagirtan li hev û din nêrîn, miraq kirin ku ew ji bo kî dibêje. 23 Şagirtekî wî xwe dabû sînga Îsa; Îsa ji wî hez dikir. 24 Şîmûn Pêtrûs bona ku ew bipirse, ka bona kî gotiye; nîşanê da wî. 25 Ew jî li sînga Îsa paldayî, jê re got: Ya Xudan, kî ye ew? 26 Îsa bersiv da: Ew, yê ku ez ê pariyê nên dakim û bidim wî ye. Û pişt re wî pariyê nan di xwarinê de dakir û da Cihûdayê Îsxeryotiyê lawê Şîmûn. 27 Piştî pariyê, wê demê Îblîs ket hundirê wî. Îsa jî ji wî re got: Tiştê ku tu dixwazî bikî, zû bike! 28 Ji yên ku li sifrê rûdiniştin, tu kesî fêhm nekirin ku, wî bona çi vê gotinê jê re got. 29 Bona ku kîsikê pera bi Cihûda re bû, hinekan ji wan gotin, dibe ku Îsa ji wî re gotibe: Bo cejnê ji me re tiştên ku lazim in bikire, an jî, tiştekî bide feqîran! 30 Dema ku Cihûda pariyê nan girt, ew hema derket derve. Û şev bû.

*Mezinahiya Îsa û emirekî nû*

Yû 15,12-14.17; 17,1-5; 1. Yû 3,10-18.23; 4,7-21

31 Dema ku ew derket derve, Îsa got: Lawê Mirov niha hatiye bilind kirin û Xwedê jî di wî de bilind bû! 32 Ger Xwedê di wî de hatibe bilind kirin, Xwedê jî dê wî di xwe de bilind bike û ew ê hema wî bilind bike. 33 Zarokno, ez hîn demekê kurt li cem we me. Hûn ê li min bigerin û mîna ku min ji Cihûdan re got: Niha ji we re jî dibêjim, hûn nikarin werin cîhê ku ez diçimê! 34 Ez emirekî nû didim we: Ji hev û din hez bikin. Mîna ku min ji we hez kir, hûn jî ûsa ji hev û din hez bikin. 35 Ger hezkirina we ji hev û din re hebe, her kes dê fêhm bike ku hûn şagirtên min in.

*Îsa ji berê ve dide xuyakirin ku dê Pêtrûs wî înkar bike*

Met 26,31-35; Marq 14,27-31; Lûq 22,31-34

36 Şîmûn Pêtrûs ji wî re got: Ya Xudan, ma tu diçî ku derê? Îsa bersiv da wî: Tu niha nikarî li pey min werî[2] cîhê ku ez ê herimê, lê belê paşê tuyê li pey min werî.

---

[1] An jî: Li dijî min, destê xwe rakir. Zebûr 41:9

[2] An jî: Were.

37 Pêtrûs jê re got: Ya Xudan,
ma çima ez niha nikarim li pey
te werim? Ez ji bo te canê xwe
didim! 38 Îsa bersiv da wî: Tuyê
ji bo min canê xwe bidî? Bi rastî
û bi rastî ez ji te re dibêjim: Heta
ku tu min sê carî înkar nekî, dîk
naure[1]!

*Rêya ku diçe Bav*

Îbr 11,10.16; 1.Tîm 2,5; Îbr 1,3;
Kol 1,15-22

14 Bila dilê we teng nebe! Ba-
weriyê bi Xwedê bînin û bi
min jî baweriyê bînin! 2 Di mala
Bavê min de gellek şunwar hene;
ger tunebûya, min ê ji we re bigo-
ta; ji ber ez diçim ku ji we re cîh
amade bikim. 3 Û ger ez herim û
ji we re cîh amade bikim û bona
ku hûn jî li wî cîhê ku ez lê me
bibin; ez ê dîsa werim û we bigi-
rim cem xwe. 4 Hûn rêya cîhê ku
ez diçimê, dizanin. 5 Tûmas jê re
got: Ya Xudan, em nizanin ku tu
bi ku ve diçî, ma em ê çawa bi rê
bizanibin? 6 Îsa ji wî re got: Rê,
rastî û jiyan ez im; heta ku ne bi
navberiya min be, tu kes nikare
were cem Bav! 7 Ger we min nas
bikirana, weyê Bavê min jî nas
bikirana û ji niha ve hûn bi wî di-
zanin û we ew dîtin.
8 Fîlîpûs ji wî re got: Ya Xudan,
Bav nîşanî me bide û ew ji me re
bes e! 9 Îsa ji wî re got: Fîlîpûs, ez
ewqas dem e bi we re me, ma te
hîn min nas nekiriye? Kî ku min
dîtibe, wî Bav dîtiye. Ma tu çawa
dibêjî: Bav nîşanî me bide? 10 Ma
qey tu bawer nakî ku, ez di Bav de
me û Bav jî di min de ye? Gotinên
ku ji we re dibêjim, ez bi xwe û
xwe nabêjim, lê belê Bavê ku di
min de disekine, xebatên xwe
dike. 11 Bawerî bi min bînin ku;
ez di Bav de me û Bav jî di min
de ye; qet nebe ji ber wan xebatan
baweriyê bînin! 12 Bi rastî û bi
rastî ez ji we re dibêjim: Yê ku ba-
weriyê bi min bîne, dê bikaribe ev
xebatên ku ez çêdikim, bi xwe jî
çêbike, heta dikare ku mezintirên
wan jî çêbike; ji ber ku ez diçim
cem Bav. 13 Hûn bi navê min her
çi bixwazin, ez ê wê bikim; da ku,
Bav di Law de bilind bibe. 14 Ger
ku hûn bi navê min tiştekî bixwa-
zin, ez ê wê bikim.

*Soza şandina Ruhê Pîroz*

Yû 16,5-15; K.Şa 2,32-33;
1.Yû 5,3; 2,3-6

15 Ger hûn ji min hez dikin, emirên
min bînin cîh! 16 Ez ê jî lava ji
Bav re bikim û dê ew ê Xemre-
vînkirek din, Ruhê Rasteqîniyê
bide we; da ku, ew heta bêdawiyê
bi we re bimîne. 17 Dinya nikare
wî qebûl bike; ji ber ku ew ne wî
dibîne û ne jî bi wî dizane; lê belê
hûn wî nas dikin; ji ber ku ew li

1 Dîk bang nade.

cem we disekine û dê di hundirê
we de be. 18 Ez we sêwî nahêlim,
ez ê werim cem we. 19 Paşî de-
mek dinî kurt û êdî dinya min
nabîne; lê belê hûn ê min bibînin;
madem ku ez dijîm, hûn ê jî bijîn!
20 Di wê rojê de hûn ê bizanibin
ku, ez di Bav de me û hûn di min
de ne û ez jî di we de me. 21 Yê
ku emirên min qebûl dike û wan
bi cîh tîne, ew e yê ku ji min hez
dike, yê ku ji min hez dike; ew ê
ji aliyê Bavê min ve bête hezkirin;
ez ê jî ji wî hez bikim û ez ê xwe
nîşanî wî didim.
22 Cihûda (ne yê Îsxeryotî) jê re
got: Ya Xudan, ma çi bû ku, tu
xwe nîşanî dinê nadî, lê nîşanî me
didî? 23 Îsa bersiv da û jê re got:
Kî ji min hez bike, dê bi gotina min
bigire û Bavê min ji wî hez dike û
em tên cem wî û li cem wî şunwarê
digirin. 24 Yê ku ji min hez neke,
bi gotinên min nagire û gotina ku
we bihîst ne ya min e, lê belê ya
Bavê ku min şandiye yî. 25 Gava
ez hîn li cem we me, min ji we re
van tiştan got. 26 Lê belê Xemre-
vînkir, Ruhê Pîroz, yê ku dê Bav bi
navê min bişîne, dê ew ê her tiştî
hînî we bike û dê hemû gotinên ku
min ji we re gotine bîne bîra we.

*Aşitiya Îsa Mesîh*

Yû 16,33; Fîl 4,6-7

27 Ez aşitiyê ji we re dihêlim, ez
aşitiya xwe didim we. Ez mîna
ku dinya dide nadim we; bila dilê
we teng nebe û metirse! 28 We
bihîstin ku min ji we re got: Ez
diçim û ez ê werim cem we! Ger
we ji min hez bikirana, bona ku
ez diçim cem Bav, hûn ê kêfxweş
bibûna; ji ber ku Bavê min ji min
mezintir e. 29 Û bona ku dema
bibe, hûn bawer bikin, min berî ku
bibe ji we re got. 30 Ez êdî bi we
re gellekî tiştan naaxifim; ji ber ku
serokê vê dinê tê û tu tiştekî wî di
min de nîne. 31 Lê belê bila dinya
bizanibe ku, ez ji Bav hez dikim û
Bav çawa emir daye min, ez ûsa
dikim. Rabin, em ji vir herin!

*Mêwa rez ya rasteqîn*

Gal 5,22; Ef 3,17-19; Kol 2,6-7

15 Ez mêwa rasteqîn im û Bavê
min rezvan e. 2 Ew her
şivmêwa ku di min de fêkî nade
jê dike û her ya ku fêkî dide, bona
hîn jî zêdetir bide, wê paqij dike.
3 Bi gotina ku min ji we re goti-
ye, hûn jixwe paqij in. 4 Di min
de bisekinin û ez di we de! Ger
şivmêw bi mêwê ve nesekine, bi
xwe nikare fêkî bide; mîna vêya,
ger hûn jî di min de nesekinin, hûn
nikarin fêkî bidin. 5 Ez mêw im,
hûn şivmêw in. Kesê ku di min de
disekine û ez di wî de bisekinim,
ew pirr fêkî dide; ji ber ku hûn bêyî
min nikarin tu tiştekî bikin. 6 Her
kî di min de nesekine, ew mîna
şivmêwê bi derve tête avêtin û hişk

dibe; wan didin hev, davêjin agir
û ew dişewitin.7 Ger hûn di min
de bisekinin û gotinê min di we
de bisekinin, hûn her çi dixwazin
bixwazin, dê ji we re bête dayîn.
8 Dema ku hûn pirr fêkî bidin, Bavê
min bi vêya bilindtir dibe û hûn ê bi
vî awayî bibin şagirtên min.
9 Mîna ku Bav ji min hez dike, ez
jî wusa ji we hez dikim; di hezki-
rina min de bisekinin! 10 Ger hûn
emirên min bînin cîh, hûn ê di
hezkirina min de bisekinin; çawa
ku, min bi emirên Bavê xwe ve
girtin û ez di hezkirina wî de di-
sekinim. 11 Bona ku kêfxweşiya
min di we de be û kêfxweşiya we
temam bibe, van tiştan ji we re
gotim. 12 Emirê min ev e: Mîna
ku min ji we hez kir, hûn jî ji hev
û din hez bikin. 13 Ji hezkirina
ku zilamek di oxra hevalên xwe
de canê xwe bide, mezintir hezki-
rin di tu kesî de nîne. 14 Ger hûn
tiştên ku min ji we re emir kiriye,
bikin, hûn hevalên min in. 15 Êdî
ez ji we re nabêjim qûl, ji ber ku
qûl nizane ku efendiyê wî çi dike;
lê belê min ji we re got heval; ji
ber, hemû tiştên ku min ji Bavê
xwe bihîst, ji we re gîhandin. 16
We min nebijartin, lê min hûn
bijart û min we wezîfedar kir ku,
hûn herin fêkî bidin û fêkiyê we
bimîne; da ku, hûn bi navê min ji
Bav çi bixwazin, ew ê bide we.
17 Ez vî emrî didim we ku, hûn ji
hev û din hez bikin!

*Neyariya Dinê*

Met 10,22-33; 2.Tîm 3,12

18 Ger dinya ji we bikerihe, bi-
zanin ku, berî we ji min kerihiye.
19 Ger hûn ji dinê bûna, dê dinya
ji yên ku daxilê wê ne hez bikira;
bona ku hûn ne ji dinê ne; lê min
we ji dinê ve bijart; ji bo vê yekê
dinya ji we dikerihe. 20 Gotina ku
min ji we re got, bînin bîra xwe:
Qûl ji efendiyê xwe mezintir nîne.
Ger zilmê li min kiribin, dê li we jî
zilmê bikin; ger gotinê min qebûl
kiribin, dê yên we jî qebûl bikin.
21 Lê belê hemû van tiştan ji ber
navê min dê bi we bikin, ji ber ku
ew yê ku min şandiye nas nakin.
22 Ger ez nehatibama û ji wan re
negotibama, gunehên wan dê tu-
nebûya; lê belê niha bona gunehên
wan lêborînên wan nîne[1]. 23 Kesê
ku ji min dikerihe, ji Bavê min jî
dikerihe. 24 Ger min xebatê ku
tu kesî nekiriye, di nav wan de
çênekiribûya, gunehên wan dê tu-
nebûya; lê belê wan niha him dîtin
û him jî ji min û Bavê min kerihîn.
25 Lê belê bona ku vê gotina di
zagona wan de hatiye nivîsandin,
were cîh: Bêsedem ew ji min ke-
rihîn[2], bû. 26 Xemrevînkir, Ruhê

1 Yanê nikarin ku bêjin, em bêguneh in.

2 Zebûr 35:19; 69:4

rasteqîniyê, yê ku ez ê ji Bav tê, ji
we re bişînim, dema were, dê ew ê
bona min şahdeyiyê bike. 27 Hûn
jî şahdeyiyê bikin; ji ber ku hûn ji
destpêkê ve bi min re bûn.

16 Ji bo ku hûn tilpekî nebin,
min ev tişt ji we re got. 2 Dê
we ji keniştan biqewirînin; belê,
saetek wusa tê ku, her zilamê we
dikujin, dibêjin qey ew ji Xwedê
re xizmetê dikin. 3 Û ew ê dê van
tiştan bikin, ji ber ku wan ne Bav,
ne jî min nas kirin. 4 Lê belê min
ev tişt ji we re got; da ku, çaxê
dema wan bê hûn wan bînin bîra
xwe. Min ew tişt di destpêkê de ji
we re negot; ji ber ku ez tevî we
bûm. 5 Lê belê niha jî, ez diçim
cem yê ku min şandiye û ji we tu
kes ji min napirse: Ma tu bi ku
derê ve diçî? 6 Lê belê bona ku
min ji we re ev tişt got, dilê we bi
keserê ve tijî bû. 7 Lê belê ez ji
we re rastiyê dibêjim: Çûyîna min
ji bo qenciya we ye; ji ber ku ger
ez neçim, ji we re Xemrevînkir
nayê; lê belê ger ez biçim, ez ê wî
ji we re bişînim. 8 Û dema ku ew
were, dê ew ê di derheqê guneh,
rastî û darazîkirinê de dinê bide
bêdengkirinê[1]. 9 Ji bo guneh, ji
ber ku baweriyê bi min naynin;
10 ji bo rastiyê, ji ber ku ez diçim
cem Bav û hûn êdî min nabînin;
11 ji bo darazî kirinê, ji ber ku
serokê vê dinê hatiye darazî kirin.
12 Hîn gellek tiştên min, yên ku
ez ji we re bêjim hene; lê belê
hûn niha nikarin baldirêjiyê li
wan bikin. 13 Lê belê dema ku
ew, Ruhê rasteqîniyê were, dê di
her rasteqîniyê de rê nîşanî we
bide; ji ber ku ew ê bi xwe nea-
xife[2]; lê belê her çi bibihîze, dê
bibêje û tiştên ku bêne dê bighîne
we. 14 Dê ew ê min bilind bike;
ji ber ku dê ew ê ji yê min bigire
û ji we re bighîne. 15 Her çi tiştê
Bav heye, ew yê min e; ji bo vêya
min ji we re got: Ew dê ji yê min
bigire û bide we.

*Xemgînî û kêfxweşî*

Yû 14,18-19; 14,27-29

16 Hinekî dem û hûn min nabînin
û dîsa hinekî dem û hûn ê min
bibînin. 17 Wê çaxê hinek şagirtên
wî ji hev û din re gotin: Hinekî
dem û hûn min nabînin û dîsa
hinekî dem û hûn ê min bibînin
û: Ji ber ku ez diçim cem Bav;
ma ew çî ye ku ji me re dibêje?
18 Wan digotin: Ev ya ku dibêje:
Hinek dem çî ye? Em nizanin ku,
ka ew çi dibêje!
19 Îsa fêhm kir ku ew dixwazin ji
wî bipirsin û ji wan re got: Ma hûn
ji bo vê gotina min ya ku: Hinekî
dem û hûn min nabînin û dîsa

---

[1] An jî: Bide hiş kirinê.

[2] An jî: Nebêje.

hinekî dem û hûn ê min bibînin
gotime, ji hev û din dipirsin? 20 Bi
rastî û bi rastî ez ji we re dibêjim:
Hûn ê bigirîn û li xwe bixin, lê
belê dê dinya kêfxweş bibe; hûn ê
keserê bikişînin, lê belê xema we
dê vegere kêfxweşiyê. 21 Dema
ku pîrek zarok tîne dinê, tengasiyê
dikişîne; ji ber ku saeta wê hatiye;
lê belê dema ku zarok tîne dinê, bi
kêfxweşiya mirovek li dinê bûye,
êdî tengasiyê di bîra xwe de nîne.
22 Mîna vê niha kesera we heye,
lê belê ez ê we dîsa bibînim û dê
dilê we şa bibe û şabûniya we kes
nikare ji we bistîne.
23 Û di wê rojê de, hûn ê tu tiştî ji
min nepirsin. Bi rastî û bi rastî ez
ji we re dibêjim: Bi navê min hûn
ji Bav her çi bixwazin, ew ê wêya
bide we! 24 Heta niha we bi navê
min tu tişt nexwestin; bixwazin û
hûn ê bigirin; da ku, bila şabûna
we temam bibe! 25 Min ji we re
ev tişt bi methelokan ve got; saet
tê ku, ez êdî bi methelokan ve ji
we re nabêjim; lê belê di derheqê
Bav de ez ê bi eşkereyî ji we re
bighînim. 26 Di wê rojê de hûn ê
bi navê min bixwazin û ez nabêjim
ku, ez ê ji bo we ji Bav bixwazim.
27 Ji ber ku Bav bi xwe ji we hez
dike; ji ber ku hûn ji min hez dikin
û ji Xwedê derketina min ve bawer dikin. 28 Ez ji Bav derketim
û hatim dinê; dîsa dinê berdidim û
vedigerim cem Bav.
29 Şagirtên wî gotin: A vay, tu
niha bi eşkereyî dibêjî û tu qet
wekokekî nabêjî! 30 Em niha
fêhm dikin ku tu bi hemû tiştî
dizanî û ji te re hewce nake ku
tu kes ji te bipirse; em ji ber vê
yekê bawerî tînin ku tu ji Xwedê
ve hatiye! 31 Îsa bersiv da wan:
Ma hûn niha bawer dikin? 32 A
vay, saet tê, belê, ew dem hatiye û
hûn ê min tenê berdin, belav bibin
û her yek ji we dê here cem yên
xwe; lê belê ez ne tenê me, ji ber
ku Bav bi min re ye. 33 Bona ku
xweşiya we di min de hebe, min
ev tişt ji we re got. Di dinê de tengasiya we heye; lê belê dilawêr
bin[1], min dinê mexlûb kir!

*Îsa ji bona bawerkiran dua dike*

Rom 8,34; Îbr 7,24-28; 9,24

**17** Îsa van tiştan got û çavên
xwe bilindî rûyê ezman kir
û got: Ya Bav, saet hat, Lawê xwe
bilind bike ku, Law jî bila te bilind bike. 2 Ji ber ku te li ser hemû
mirovahiyê, rayedariyê da wî, da
ku, ew jiyana abadîn bide hemû
kesên ku te dane wî. 3 Jiyana
abadîn jî ew e ku, bila te, tenê
Xwedayê rastiyê û Îsa Mesîhê ku
te şandiye nas bikin. 4 Bi qedandina xebata ku te ji bo çêkirinê da
min, min te li ser rûyê erdê bilind
kir. 5 Û ya Bav, dema ku dinya

1 Cesûr, wêrek.

hîn tunebû û bilindahiya min ya
ku li cem te bû, niha bi wê min li
cem xwe bilind bike.
6 Min navê te ji mirovên ku te di
dinê de dan min re, eşkere kir; ew
yê te bûn, te wan da min û wan bi
gotina te girtin. 7 Ew niha dizanin
ku, hemû tiştên te dane min, ew ji
te ne. 8 Ji ber, gotinên ku te dan
min, min dan wan û wan qebûl
kirin; wan bi rastî fêhm kirin ku
ez ji te derketim û hatim û wan
bawerî anîn ku, te min şandiye.
9 Ez ji bo wan rica dikim; ne ji
bo dinê, lê belê ji bo yên ku te
dane min, rica dikim; ji ber ku
ew yên te ne. 10 Hemû tiştên min
yên te ne, yên te jî yên min in û
ez di wan de hatim bilind kirin.
11 Ez êdî ne li dinê me, lê ew li
dinê ne û ez têm cem te. Ya Bavê
Pîroz; kesên ku te da min bi navê
xwe biparêze ku, bila ew jî mîna
me bibin yek! 12 Dema ez li
cem wan bûm, min wan bi navê
teyê ku te dabû min hêvişand û
parast û bona ku Nivîsa Pîroz
were cîh; ji xeynî lawê helaqê,
ji wan kesekî din helaq nebû.
13 Lê belê ez niha têm cem te û
van tiştan di dinê de dibêjim, da
ku, bila kêfxweşiya min di wan
de temam bibe. 14 Min gotina te
da wan û dinê ji wan kerihî; ji ber
çawa ku ez ne ji dinê me, ew jî
ne ji dinê ne. 15 Ez ne ji bo ku
tu wan ji dinê rake, lê bona ku
tu wan ji yê xerab biparêzî rica
dikim. 16 Çawa ku ez ne ji dinê
me, ew jî ne ji dinê ne. 17 Wan bi
rastiyê ve pîroz bike! Û gotina te
rastî ye. 18 Mîna ku te min şand
dinê, min jî wan şandin dinê.
19 Û di oxra wan de ez xwe pîroz
dikim ku, bila ew jî bi rastiyê ve
bên pîroz kirin.
20 Tenê ne ji bo wan, lê belê ji bo
yên ku bi gotina wan baweriyê bi
min bînin jî, bona ku hemû bibin
yek, ez lava dikim; 21 çawa ku,
ya Bav, tu di min de yî û ez jî
di te de me, bila ew jî di me de
bin, da ku, bila dinya baweriyê
bîne ku te min şandiye. 22 Û min
bilindahiya ku te da min, da wan
ku, bila mîna ku em yek in, ew jî
bibin yek. 23 Ez di wan de û tu di
min de, da ku, ew ji bona yekîtiyê
temam bibin û bila dinya fêhm
bike ku te min şandiye û mîna
ku tu ji min hez dikî, tu ji wan jî
hez dikî.
24 Ya Bav, ez dixwazim ku, yên
te dane min jî li cîhê min, bi min
re bin ku, bila ew bilindahiya min
ya ku te daye min bibînin; ji ber
ku te berî afirandina dinê ji min
hez kir. 25 Ya Bavê dadmend!
Dinya te nas nekir, lê belê ez te
nas dikim û vana jî dizanin ku te
min şandiye. 26 Bona hezkirina te
ya ku ji bo min heye, di wan de be
û ez jî di wan de bim; min navê te
ji wan re gîhand û ez ê bighînim.

### *Xaçkirin û vejîna Îsa*

Met 26,47-56; Marq 14,43-50;
Lûq 22,47-53

18 Paşî ku Îsa van tiştan got,
derket û bi şagirtên xwe re
çû wî aliyê newala Kîdronê; li wê
derê bexçeyek hebû; ew û şagirtên
xwe ketin nav wê. 2 Cihûdayê ku
wî da dest jî bi wî cîhî dizanîbû; ji
ber ku Îsa gellek caran bi şagirtên
xwe li wê derê dihatin cem hev.
3 Bi vî awayî Cihûda, gîvalek[1]
leşker û tevî wan ji karmend û ji
serokên kahînan û Fêrisiyan girt û
hat wê derê; bi fanosan û pêtalan
û çekan ve. 4 Îsa bi hemû tiştên
ku dê bê serê wî dizanîbû, derket
pêşiyê û ji wan re got: Ma hûn li
kî digerin? 5 Wan bersivê dan wî:
Li Îsayê Nisretî! Îsa ji wan re got:
Ez im! Cihûdayê ku wî da dest jî
bi wan re sekinî bû. 6 Dema ku wî
ji wan re got: Ez im! paş ve çûn û
ketin erdê. 7 Li ser vê yekê wî ji
wan dîsa pirsî: Ma hûn li kî dige-
rin? Wan jî gotin: Li Îsayê Nisretî!
8 Îsa bersivê da: Min ji we re got
ku ez im. Ji bo wê, ger hûn li min
digerin, vana berdin bila ew herin!
9 Da ku, gotina wî ya ku gotibû: Ji
yên ku te dane min, tu kesî winda
nekirim, were cîh. 10 Şûrek Şîmûn
Pêtrûs hebû, wî wê kişand û li xiz-
metkarê Serokkahîn xist û guhê
wî yê rastê jê kir; navê wî xizmet-
karî Malxos bû. 11 Wê demê Îsa
ji Pêtrûs re got: Şûrê xwe têxe qa-
lanê! Ma qey ez ji kaseya[2] ku Bavê
min daye min, venexwim?

### *Îsa li ber Hena û Qayafa*

Met 26,57-75; Marq 14,53-72; Lûq
22,54-71

12 Bi vî awayî gîvale, fermandar û
karmendên Cihûdan Îsa girtin û wî
girêdan. 13 Û wan wî pêşiyê birin
cem Hena; ji ber ew xezûrê Qaya-
fayê ku wê salê Serokkahîn e, bû.
14 Yê ku bi gotina: Di oxra netewê
de mirina zilamekî bi xêrtir e, şîretê
li Cihûdan kiribû, Qayafa bû.

### *Pêtrûs Îsa înkar dike*

15 Şîmûn Pêtrûs û şagirtekî din
li pey Îsa ve diçûn. Bona ku ew
şagirt nasê Serokkahîn bû, bi Îsa
re ket hewşa Serokkahîn. 16 Lê
belê Pêtrûs ji derve, li cem dêrî
sekinî bû. Wê demê ew şagirtê ku
Serokkahîn nas dikir, çû bi keçi-
ka dergevan re axifî û wî Pêtrûs jî
bir hundir. 17 Keçika dergevan ji
Pêtrûs pirsî: Ma tu jî ne ji şagirtên
vî mirovî yî? Pêtrûs got: Na, ne
ez im! 18 Bona ku hewa sar bû,
xizmetkar û karmendan bi komirê
agir vêxistibûn û li ber sekinîbûn
û xwe germ dikirin; Pêtrûs jî li
cem wan sekinîbû û xwe germ
dikir.

1 Liqek.

2 Tas, kasik.

19 Wê demê Serokkahîn, ji bo
şagirt û hînkariya wî, ji Îsa pirs kir.
20 Îsa bersiv da wî: Min ji dinê re bi
eşkereyî got; min her tim di kenişt
û Perestgeha ku hemû Cihûd li wir
dicivin de hîn kir û min tu tişt bi
dizî negot. 21 Ma çima tu ji min
pirs dikî? Ji yên ku axaftina min
bihîstine bipirse; a vay, ew dizanin
min çi gotiye! 22 Û piştî ku wî van
tiştan got, yek ji karmendên ku li
wê derê sekinîbûn, bi gotina: Ma
tu bi vî awayî bersivê didî Serok-
kahîn? şîrmaqê li Îsa xist.
23 Îsa ji wî re got: Ger min rast
negotibe, bo nerastiyê şahdeyiyê
bike; lê belê ger rast be, ma tu çima
li min dixî? 24 Li ser vê yekê Hena
wî girêdayî şand cem Serokkahîn
Qayafa. 25 Şîmûn Pêtrûs hîn li
cem agir sekinîbû û xwe li wê derê
germ dikir. Ji wî re gotin: Ma tu jî
ne yek ji şagirtên wî yî? Wî înkar
kir û got: Na, ne ez im! 26 Xizmet-
karekî Serokkahîn, merovê wî xiz-
metkarê ku Pêtrûs guhê wî jê kiriye
bû, jê re got: Ma min di nav bexçê
de te bi wî re nedît? 27 Pêtrûs dîsa
înkar kir û hema dîk uriya[1].

*Îsa li ber Pîlato*

Met 27,1-2,11-31; Marq 15,1-20;
Lûq 23,1-23

28 Li ser vê yekê, wan Îsa ji cem
Qayafa girtin û birin qesra walî.
Hîn serê sibê zû bû. Û bona ku ew
mindar nebin û Fisihê bixwin, ew
bi xwe neketin qesra walî. 29 Ji
ber vê yekê Pîlato derket, hat cem
wan û got: Ma giliyê we yî li dijî vî
mirovî çî ye? 30 Wan bersiv dan û
ji wî re gotin: Ger vî mirovî xerabî
nekiriba, me wî ji te re nedianîn!
31 Wê demê Pîlato ji wan re got:
Hûn bi wî bigirin û li gor zagona
xwe daraziyê li wî bikin! Cihûdan
ji Pîlato re gotin: Ji me re ne caiz
e ku em tu kesî bikujin! 32 – da
ku, bi nîşan dayîna ka dê ew ê bi
mirinekî çi şiklî ve bimire, gotina
ku Îsa gotiye bila bête cîh.
33 Pîlato dîsa çû hundirê qesra
walî; wî bangî Îsa kir û jê pirs kir:
Ma qiralê Cihûdan tu yî? 34 Îsa
bersiv da wî: Ma tu vêya bi xwe
dibêjî, an kesên din ji bo min ji
te re gotin? 35 Pîlato bersiv da:
Ma ez Cihûd im? Gelê te û se-
rokên kahînan te dan destê min!
Ma te çi kiriye? 36 Îsa bersiv
da: *Qiraletiya min ne li vê dinê
ye; ger qiraletiya min li vê dinê
bûba, xizmetkarên min ji bo ku
ez nekevim destê Cihûdan dê bi-
xebitiyana; lê belê niha qiraletiya
min ne li vir e.* 37 Pîlato jî ji wî re
got: Ma nexwe tu qiral î? Îsa ber-
siv da: Tu dibêjî ku ez qiral im[2].
Ez bona vêya welidîme û bona
vêya hatime dinê ku, ji bo rasti-

[1] Dîk bang da.

[2] An jî: Tu vêya dibêjî, ji ber ku ez qiral im.

yê şahdeyiyê bikim; her kesê ku
ji aliyê rastiyê ne, dê dengê min
bibihîzin.
38 Pîlato ji wî re got: Ma rastî çî
ye? Piştî ku vêya got, dîsa derket,
çû cem Cihûdan û ji wan re got:
Ez di wî de qet sûcekî nabînim!
39 Lê belê kevneşopa we ye ku ez
di Cejna Fisihê de yekî ji bo we
berdim; ma hûn dixwazin ku ez
qiralê Cihûdan ji bo we berdim?
40 Ji ber vê yekê dîsa qêriyan û
gotin: Ne vî mirovî, lê belê Bara-
bas! Lê Barabas rêbirek bû.

*Daraziya mirinê*

Met 27,26-31; Marq 15,15-20;
Lûq 23,23-25

19 Wê çaxê Pîlato Îsa girt û da
ber qamçiyan. 2 Leşkeran jî ji
stiriyan tacek vegirtin û dan serê wî
û qeftanekî mor li wî kirin 3 û diha-
tin cem wî û digotin: Silav ya qiralê
Cihûdan! Û şîrmaqan li wî xistin. 4
Pîlato dîsa çû derve û ji wan re got:
A vay, ez wî ji we re tînim derve
ku, hûn bizanibin min di wî de qet
sûcek nedîtiye! 5 Li ser vê yekê Îsa,
tacê stirîn li serî bû û xeftanê erxe-
wanî jî li xwe kirî çû derve. Pîlato
ji wan re got: A vay, ew zilam! 6
Dema ku serokên kahînan û kar-
mendan wî dîtin, qêriyan û gotin:
Wî xaç bike, wî xaç bike! Pîlato ji
wan re got: Hûn wî bigirin û bi xwe
wî xaç bikin! Ji ber ku, ez di wî de
qet sûcekî nabînim!
7 Cihûdan bersiv dan wî: Zago-
nek me heye; li gor wê zagonê
divê ew bimire; ji ber ku, wî xwe
bi xwe, kir Lawê Xwedê!
8 Dema ku Pîlato vê gotinê bihîst,
hîn zêde tirsiya 9 û dîsa çû qesra
walî û ji Îsa re got: Tu ji ku derê
yî? Lê belê Îsa bersivê neda wî.
10 Pîlato jî ji wî re got: Ma tu bi
min re naaxifî? Ma tu nizanî ku,
ji bo berdana te qudreta min heye
û ji bo xaçkirina te jî qudreta min
heye? 11 Îsa bersivê da wî: Ger
ji te re ji jor ve nehatibûya dayîn,
qet qudreta te li ser min dê tune
bûya. Ji ber vê yekê, gunehên
kesê ku min daye destê te, hîn
jî mezintir e! 12 Ji bo vê yekê
Pîlato bona berdana wî dixebitî;
lê belê Cihûdan qêriyan û gotin:
Ger tu viya berde, tu ne hevalê
Qeyser î! Kî xwe bike qiral, ew
li dijberî Qeyser radibe! 13 Pîla-
to jî dema ku ev gotin bihîst, wî
Îsa derxist derve û li cîhê ku navê
wê Rûkevirê ye, lê belê bi Îbranî
Gabata ye; li ser kursiya darazîki-
rinê rûnişt. 14 Roja Amadekirinê
ya Fisihê bû û saet nêzîkî şeşa bû.
Û wî ji Cihûdan re got: A vay, qi-
ralê we! 15 Lê belê ew qêriyan:
Wî rake, wî rake û li xaçê bixe!
Pîlato ji wan re got: Ma ez qiralê
we li xaçê bixim? Serokên kahîn-
an bersiv dan: Xeynî Qeyser, qi-
ralê me tune! 16 Wê gavê bona
ku li xaçê bixin, wî da wan.

*Xaçkirina Îsa Mesîh*

Met 27,32-50; Marq 15,21-37;
Lûq 23,26-46; Gal 3,13-14; 1.Pêt 2,24

17 Wê demê wan Îsa girtin; wî,
xaça xwe hilgirt û çû cîhê ku navê
wê Hestiyê Serî, bi Îbranî Golgo-
ta ye. 18 Li wê derê wî û tevî wî,
wekî din duduyan; wekî Îsa di na-
vînê de, yên din jî yek li aliyekê
û yek jî li aliyê dinê bin, li xaçê
xistin. 19 Pîlato lewhekê nivîsand
û wê li ser xaçê ve danî: ÎSAYÊ
NISRETÎ, QIRALÊ CIHÛDAN!
nivîsandî bû. 20 Û gellekên Cihû-
dan vê lewhê xwendin, ji ber, cîhê
ku Îsa lê hatibû xaçkirin, nêzîkî
bajêr bû û ew lewha bi Îbranî,
Grekî û Latînî hatibû nivîsandin.
21 Ji bo vê yekê serokên kahînên
Cihûdan ji Pîlato re gotin: Ne Qi-
ralê Cihûdan e, lê belê nivîsa ku:
Vî mirovî bi xwe got: Ez Qiralê
Cihûdan im! binivîse. 22 Pîlato
bersivê da: Her çi nivîsandibim,
nivîsandime!
23 Piştî ku leşkeran Îsa xaç ki-
rin, kincên wî girtin û kirin çar
par ku, ji her leşkerekî re parek
bikeve. Kirasê wî jî girtin; kiras
qumaşek seranser bêdirûtin bû.
24 Wan jî ji hev û din re gotin:
Em vêya neçirînin, lê belê em
bo wê vijagê bavêjin ku hela ew
dibe ya kî; da ku, ya bi gotina:
Wan kincên min di nav hev de
par kirin, li ser kirasê min vijagê
avêtin[1], hatiye nivîsandin bête
cîh. Leşkeran vana kirin.
25 Li cem xaça Îsa dayika wî û
xwuşka dayika wî, Meryema
pîreka Klopa û Meryema Mej-
delanî sekinî bûn. 26 Û dema Îsa
diya xwe û ew şagirtê ku ji wî
hez dikir dît, ji diya xwe re got:
Pîrek, a vay, lawê te! 27 Pişt re ji
şagirt re got: A vay, diya te! Paşî
wê saetê şagirt wê girt mala xwe.
28 Piştî vê yekê, Îsa êdî dizanîbû
ku niha her tişt temam bûye, bona
ku Nivîsa Pîroz[2] were cîh, got: Ez
tî bûm! 29 Qabek bi sîrkê ve tijî li
wir hatibû danîn; sîngerek bi sîrkê
ve tijî kirin û bi serê darekî ve da-
kirin û dan devê wî. 30 Dema ku
Îsa sîrke girt, got: Temam bû! serê
xwe xwar kir û ruhê xwe da.

*Tenişta Îsa tê qul kirin û gotina peyxambertiyê tê cîh*

Met 27,45-56; Marq 15,33-41;
Lûq 23,44-49

31 Ji ber ku roja Amadekirinê bû û
hewce dikir ku ceset di roja Sebtê
de di xaçê de nemînin, – ji ber ku
ew roja Sebtê rojeke zehf girîng bû
–; Cihûdan ji Pîlato rica kirin ku ew
çêqên wan bide şikandin û cesedên
wan bide daxistin. 32 Wê demê
leşker hatin û çêqên yê yekemîn û
yê din ku bi wî re hatibûn xaçkirin

---

[1] Zebûr 22:18

[2] Zebûr 69:21

şikandin. 33 Lê belê dema ew ha-
tin cem Îsa, wan dîtin ku ew jixwe
miriye, wan çêqên wî neşikandin.
34 Lê belê yekî ji leşkeran bi rimê
tenişta wî qul kir û hema xwîn û av
herikî. 35 Yê ku vêya dît şahdeyiyê
kir û şahdeyiya wî rast e û bona ku
hûn bawer bikin, ew bi xwe dizane
ku wî rastiyê gotiye. 36 Ji ber ku
ev tiştan bona Nivîsa Pîroz ku: Tu
hestiyekî wî naşikê[1], dibêje were
cîh, çebûn. 37 Û dîsa nivîsekê din
dibêje: Dê li zilamê ku bedena wî
qul kirine, binihêrin[2].

*Binaxkirina Îsa*

Met 27,57-61; Marq 15,42-47;
Lûq 23,50-56

38 Piştî van tiştan, Ûsivê Arîme-
tayî yê ku şagirtekî Îsa bû û ji tirsa
Cihûdan xwe veşartî bû, ji bo ra-
kirina cesedê Îsa, ji Pîlato rica kir
û Pîlato destûrê da. Li ser vê yekê
ew hat û cesedê Îsa rakir. 39 Nî-
kodêmûsê ku pêşiyê bi şev hatibû
cem Îsa jî, nêzîka sed lîtir miska
tevlîhev û darê zendeqê girt anî.
40 Wê demê wan cesedê Îsa gir-
tin û li ser kevneşopa binaxkirina
Cihûdan, wî tevî biharat bi cawên
kitanî ve pêçandin. 41 Li cîhê ku
Îsa lê hatibû xaçkirin, bexçeyek
û di nav wî bexçeyî de gorek nû
hebû ku, hîn tu kes nekiribûnê.
42 Û bona ku roja Amadekirinê
ya Cihûdan bû, wan Îsa kirin wê
derê; ji ber ku gor nêzîk bû.

*Gora vala*

Met 28,1-10; Marq 16,1-8; Lûq 24,1-12;
Zeb 16,8-10; K.Şa 2,23-32; 17,31;
Rom 1,4; 1.Kor 15,1-18; 1.Pêt 1,3-4;
Pey 1,17-18

20 Di roja pêşîn ya hefteyê de,
gava hîn tarî bû, Meryema
Mejdelanî zû hat gorê; wê dît ku
kevirê devê gorê hatiye rakirin.
2 Wê demê ew bi revîn hat cem
Şîmûn Pêtrûs û şagirtê din yê ku
Îsa jê hez dikir û ji wan re got:
Xudan ji gorê rakirine û em niza-
nin ku wî kirine ku derê! 3 Pêtrûs
û ew şagirtê din derketin û berbi
gorê çûn. 4 Herdu jî pev re baz di-
dan; lê belê ew şagirtê din ji Pêtrûs
hîn jî bi leztir baz da û pêşiyê ew
hat gorê 5 û wî xwe xwar kir û li
hundirê gorê nihêrt, cawên keten[3]
li erdê raxistî dît; lê belê neçû hun-
dir. 6 Wê demê li pey wî Şîmûn
Pêtrûs jî hat û ket gorê û cawên ki-
tanî ku li erdê bûn 7 û destmala ku
li serê Îsa bû; ne li cem cawên ki-
tanî, wekî din li cîhekî din pêçayî
dît. 8 Wê demê ew şagirtê din yê
ku berî gihîştibû gorê jî ket hun-
dir dît û bawerî anî. 9 Ji ber ku
wan hîn bi wê Nivîsa Pîroz ya ku

1 (2.Mûsa 12:46; Zebûr 34:20)
2 Zekerya 12:10
3 Kitan, zegerek.

dibêje, Îsa divê ji mirinê rabe, ni-
zanîbûn. 10 Wê demê şagirt dîsa
çûn malên xwe.

*Îsa xwe xuyayî Meryema Mejdelanî dide*

Met 28,9-10; Marq 16,9-11

11 Lê belê Meryem bi girî ji derve
li cem gorê sekinîbû. Dema ku ew
digiriya, xwar bû û li hundirê gorê
nihêrt 12 û wê du milyaketên ku
kincê sipî li xwe kirine dîtin; ew
li cem cesedê Îsa, yek li aliyê serî
û yek jî li aliyê lingan rûniştîbûn.
13 Wan ji wê re gotin: Pîrekê, ma
tu çima digirî? Wê jî ji wan re got:
Ji ber ku Xudanê min rakirine û
ez nizanim ku wî kirine ku derê!
14 Û gava wê vêya got, li paş
xwe nihêrt û dît ku Îsa li wê derê
sekiniye û nizanîbû ku ew Îsa ye.
15 Îsa ji wê re got: Pîrek, ma tu
çima digirî? Ma tu li kî digerî? Wê
jî got qey ew baxçevan e û ji wî re
got: Efendî, ger te wî biribe, ji min
re bibêje, ka te wî kiriye ku derê û
ez jî wî ji wir bînim! 16 Îsa ji wê
re got: Meryem! Ew jî vegeriya
û bi zimanê Îbranî ji wî re got:
Rabbûnî! ku bi mana Mamoste ye.
17 Îsa ji wê re got: Destê xwe nede
min! Ji ber ku ez hîn derneketime
cem Bav; lê belê tu here cem
birayên min û ji wan re bibêje: Ez
derdikevim cem Bavê xwe û Bavê
we, cem Xwedayê xwe û Xwedayê
we. 18 Meryema Mejdelanî hate
cem şagirtan û ji wan re got: Min
Xudan dît! Û tiştê ku Xudan ji wê
re gotibû, wê ji wan re got.

*Îsa xwe xuyayî Şagirtên xwe dide*

Met 28,16-20; Marq 16,14-18;
Lûq 24,36-49

19 Wê rojê, di roja pêşîn ya heftê
de, dema êvar bû, gava deriyê mala
ku şagirt tê de bûn, ji tirsa Cihûdan
girtî bû, Îsa hat û di nav wan de se-
kinî û ji wan re got: Bila xweşî[1] ji
we re be! 20 Û gava ku wî ev got,
destê xwe û tenişta xwe nîşanî wan
da. Şagirtan jî Xudan dîtin û dilşa
bûn. 21 Îsa dîsa ji wan re got: Bila
xweşî ji we re be! Mîna ku Bav min
şandiye, ez jî we dişînim. 22 Piştî
ku wî vêya got, pif kir wan û got:
Ruhê Pîroz bistînin! 23 Hûn gu-
nehên kî bibexşînin, dê ew ê ji wan
re bête bexşandin û hûn bi gunehên
kî ve bigirin, dê ew ê bêne girtin.
24 Lê belê Tûmas, yê ku jê re
digotin: Zo[2], yekî ji Donzdehan bû
û dema ku Îsa hat, ew ne bi wan
re bû. 25 Wan şagirtên din ji wî re
gotin: Me Xudan dît! Lê belê wî ji
wan re got: Ger ez cîhê bizmaran di
destên wî de nebînim û tilîka xwe
nedim cîhê bizmaran û destê xwe
jî nekim tenişta wî, bawer nakim!
26 Heyşt roj pişt re, şagirtên wî dîsa
li hundir bûn û Tûmas jî bi wan re

---

[1] Aştî, silamet.

[2] Bi Grekî: Dîdîmos.

bû. Dema derî girtî bû, Îsa hat di
nav wan de sekinî û got: Bila aşitî
ji we re be! 27 Piştre ji Tûmas re
got: Tilîka xwe dirêj bike û li destê
min binihêre; destê xwe jî dirêj
bike û têxe tenişta min û bêbawerî
nebe, lê bibawerî be! 28 Tûmas
bersiv da û ji wî re got: Xudanê
min û Xwedayê min! 29 Îsa ji wî re
got: Ji ber ku te min dît, te bawerî
anî; lê belê xwezî li wan, yên ku
nedîtine û baweriyê tînin!

*Nûçeya Kêfxweşiyê û*
*çavkaniya baweriyê*
1.Yûh 5,12-13

30 Îsa li ber şagirtên xwe hîn
pirr mûcîzeyên din çêkir ku, ew
di vê kitêbê de nehatine nivîsan-
din. 31 Lê belê bona hûn bawe-
riyê bînin ku, Îsa Mesihê Lawê
Xwedê ye û bona ku hûn bawer
bin û bi navê wî di we de jiyan
hebe, vana hatine nivîsandin.

*Îsa li ber gola Taberiyê xwe nîşanî*
*Şagirtan dide*

21 Piştî van tiştan, Îsa di
tenişta gola Taberiyê de
xwe dîsa nîşanî şagirtan da. Û wî
bi vî awayî xwe nîşan da: 2 Şîmûn
Pêtrûs, Tûmasê ku jê re Zo digo-
tin û ji Kanaya Celîlê Natanyêl û
lawên Zebedî û du heb şagirtên
wî yên din bi hev re bûn. 3 Şîmûn
Pêtrûs ji wan re got: Ez diçim girti-
na masiyan! Wan gotin: Em jî bi te
re bên. Ew derketin û siwarî lotkê
bûn û wan wê şevê tiştekî negirtin.
4 Dema ku êdî roj hilat, Îsa di
tenişta golê de sekinî, lê belê
şagirtan fêhm nekirin ku, ew Îsa
ye. 5 Û Îsa ji wan re got: Zarokno,
ma xwarinek we heye? Wan bi go-
tina: Na! bersivê dan wî. 6 Wî jî ji
wan re got: Torê berdin aliyê rastê
yê lotkê, hûn ê bibînin! Li ser vê
yekê wan berdan û ji ber pirrbû-
na masiyan êdî wan nikarîbûn ku
torê kaş bikin. 7 Wê demê şagirtê
ku Îsa jê hez dikir, ji Pêtrûs re got:
Ev Xudan e! Şîmûn Pêtrûs, dema
bihîst ku ew Xudan e, kirasê xwe
li xwe pêçand, ji ber ku ew tazî bû
û xwe avêt golê. 8 Lê belê wan
şagirtên din, tora masiyan kaş ki-
rin bi lotka biçûk ve hatin; (ji ber
ku ew ji reşayiyê ne dûr bûn, lê
qasî du sed gezî dûr bûn).
9 Dema derketin reşayiyê, wan
dîtin ku agirê komirê dişewite û
li ser agir masî û nan hene. 10 Îsa
ji wan re got: Niha wan masiyên
ku we girtine bînin! 11 Û Şîmûn
Pêtrûs li lotkê siwar bû û tora ku
bi sed û pêncî û sê masiyên me-
zin ve tijî ye kişand reşayiyê û
çawa ku ewqas pirr bûn jî, dîsa jî
tor neçiriya. 12 Îsa ji wan re got:
Werin, taştê bixwin! Tu şagirtekî
newêriya ku jê pirs bike û bibêje:
Ma tu kî yî? Ji ber wan dizanîbûn
ku, ew Xudan e. 13 Îsa hat nan
rahişt, da wan û bi vî awayî masî

jî da wan. 14 Îsa piştî ji mirinê
rabû, niha ev cara sisiyan bû ku,
wî xwe nîşanî şagirtên xwe dida.

*Îsa hezkirina Pêtrûs diceribîne*

1.Pêt 5,1-4; 1.Yû 4,16-19; Pey 2,4-5

15 Bi vî awayî dema wan taştê
xwarin, Îsa ji Şîmûn Pêtrûs re got:
Ya Şîmûnê lawê Yûhena, ma tu ji
van hîn jî zêdetir ji min hez dikî?
Wî jê re got: Belê, ya Xudan, tu
dizanî ku ez ji te hez dikim! Îsa jî
ji wî re got: Berxên min biçêrîne!
16 Cara diduyan dîsa ji wî re got:
Ya Şîmûnê lawê Yûhena, ma tu ji
min hez dikî? Wî jê re got: Belê,
ya Xudan, tu dizanî ku ez ji te hez
dikim. Îsa ji wî re got: Mîhên min
biçêrîne! 17 Cara sêwemîn jê pirs
kir: Ya Şîmûnê lawê Yûhena, ma
tu ji min hez dikî? Pêtrûs ji ber ku
wî cara sêwemîn jê pirs kir û got:
Ma tu ji min hez dikî? xemgîn bû
û ji wî re got: Ya Xudan, tu bi her
tiştî dizanî; tu dizanî ku, ez ji te hez
dikim. Îsa ji wî re got: Mîhên min
biçêrîne! 18 Bi rastî û bi rastî ez ji
te re dibêjim: Gava ku tu xort bû, te
xwe girê dida û bi ku ve bixwesta
tuyê biçûya wê derê; lê belê gava
ku tu kal bibî, tuyê destê xwe dirêj
bikî û yekî din dê te girê bide û te
bibe cîhê ku tu naxwazî biçê. 19 Wî
vêya, bona ku ka dê ewê[1] bi miri-
nek çi awayî Xwedê bilindtir bike,
nîşan bide, got. Û piştî ku vêya axi-
fî, jê re got: Li pey min were!
20 Pêtrûs li paş xwe vegeriya û dît,
ew şagirtê ku Îsa jê hez dikir li pey
wan tê. Ew şagirtê ku, di xwarina
êvarê de, xwe dabû ber sînga Îsa û
gotibû: Ya Xudan, ew ê ku te bide
dest kî ye? 21 Pêtrûs wî dît û ji Îsa
re got: Ya Xudan, ma dê vêya çi
bibe? 22 Îsa ji wî re got: Ger ez
bixwazim heta ku ez werim, ew
bisekine, ma çiyî te ji vê ye[2]? Tu
li pey min were! 23 Bi vî awayî:
Di nav birayan de gotin derket ku,
ew şagirt namire. Lê belê Îsa ji wî
re negotibû ku: Ew namire; lê belê
wî tenê gotibû ku: Ger ez bixwa-
zim heta ku ez werim, ew biseki-
ne, ma çiyî te ji vê ye[3]?

*Van Bûyeran bi navdîtiya yê ku wan temaşe kiriye û şahdeyiyê ji wan re dike hatine nivîsandin*

1.Yû 1,1-4; Yû 20,30

24 Şagirtê ku şahdeyiyê ji van
tiştan re dike û van tiştan nivî-
sandiye ew e û em dizanin ku,
şahdeyiya wî rast e. 25 Hîn gellek
karên din yên ku Îsa çêkiriye hene;
ez bawer im ku, ger ew yek bi yek
bihatana nivîsandin, kitêbên ku
dê bihatana nivîsandin heta ku di
dinê de jî bi cîh nebûna.

---

[1] Pêtrûs.
[2] An jî: Ma ji te re çi?
[3] An jî: Ma ji te re çi?

# KARÊN ŞAGIRTAN

*Pêşgotin*

"Karên Şagirtan" wesîqeya destpêka Civaka (Dêra) Mesîh û belavbûna wê yî gellek cîhî tîne zimên e. Nivîskarê wê yî ji Xwedê ve peyxamê girtiye Lûqa ye. Lûqa yê di sala 63'yan de ji Romayê nivîsandiye, berê kirin û hîndayinên Îsa girtibû qelemê (nivîsandibû). Mirov ger bixwaze di derheqê mijarê de zanînek hîn jî mezin bi dest bixe; divê şîroveya destpêka beşa Lûqa bixwîne.
Têyofîlo yê nivîsa berê jî ji wî re hatiye pêşkêş kirin, mirovekî ji nêzîk ve bi jiyan û kirinên Îsa ve eleqeder bûye û gellek tê nasîn e. Lûqayê hekîm[1] û ramankir e, bona destpêk û geşiya belavoka xwedanî bi wêrekî bikole (lêgerînê bike) wezîfedar kiriye. Bi vî awayî, bona berhem belavî hemî mirovahiyê bibe, alîkarî kiriye.
Bila mirov bala xwe bide gotina "em (me)" ya di pirtûkê de. Birrên 16:11-17; 20:5; 21:18'yan. Lûqa beşdarî hemî gerên Nûçevan Pawlos û yê pêşîn û ya dawîn bûye, di rêya Romayê de jî hevrêtî ji wî re kiriye. Tê fêhm kirin ku têkiliyên Dr. Lûqa, bi nûçevanên din re jî heye.
Ev nivîsa, ji pênûska rewşenbîrekî bûye şahdeyê derketina Civaka bawerkiran (Dêrê) ji Orşelîmê, geşbûna wê û li her derê belav bûna wê derketiye. Mirov dikare vê nivîsa bi vî awayî kurt bike:

1. Destpêka Civaka bawerkiran (Dêrê) 1:1-5;42
2. Zordestî rêya belavbûnê vedike 6:1-9:31
3. Nûçevan Pêtrûs nûçeyê belav dike 9:32-12:24
4. Pêşengiya civaka li Antaqyayê 12:25-16:5
5. Rêvîtiyên Nûçevan Pawlos 16:6-19:41
6. Vegera Nûçevan Pawlos ya Orşelîmê û rêvîtiya wî yî Romayê 20:1-28:31

---

1 Bijîşk.

*Destpêk*
Lûq 1,1-4

1 Ya Têyofîlos,
di derbarê hemî tiştên ku Îsa
ji şagirtên xwe yên ku bijartibûn
re bi navgîniya Ruhê Pîroz emir
da pişt re, 2 heta roja ku bi jor ve
hate stendin, divê kirine û divê
jî dest bi hînkirinê kiriye de pir-
tûka yekemîn nivîsandim. 3 Wî,
paşî êşa mirinê kişand, bi gellek
nîşanên ku mirov bi wan bawer
bibin, vejînbûna xwe nîşanî wan
da; qasî çel rojî xuyayî wan bû û
di derheqê Serweriya Xwedê de,
bi wan re axifî.

*Soza Ruhê Pîroz*
Lûq 24,44-49

4 Û gava ew bi wan re civiya, bona
ku bila ji Orşelîmê veneqetin[2], lê
belê li benda wad a Bavo bimînin,
emir da wan; wê wadê we ji min
bihîstin; 5 ji ber ku Yehya bi avê
ve vaftîz kir, lê belê hîn gellek roj
derbas nebe, hûn ê bi Ruhê Pîroz
ve bêne vaftîz kirin.
6 Dema ew civiyan, ji wî pirs ki-
rin û gotin: Ya Xudan, ma tuyê
di vê demê de serweriya Îsraêlê
vegerîne û bide wan? 7 Lê belê
wî ji wan re got: Zanîna wextên
an jî demên ku Bavo kiriye bin
rayedariya xwe, ne aidê we ye. 8
Lê dema Ruhê Pîroz dakeve ser
we; hûn ê qudretê bigirin; hûn ê li
Orşelîmê û li hemûya Cihustanê û
li Samîriyê û li çar hawirdorê dinê
bibin şahdeyê min!

*Îsa Mesîh bilindî ezmanan dibe*
Marq 16,19; Lûq 24,50-52

9 Paşî wî van tiştana got; li ber
çavên wan bi jor ve hate hilatin
û ewrek wî ji ber çavên wan ve
girt. 10 Û dema ew diçû, wan
çavên xwe bi ezman ve beliqan-
dibûn; a vay, du zilamên kinc sipî
li cem wan sekinîn 11 û gotin: Ya
Celîlîno, hûn çima li vir sekinîne
û li ezman dinêrin? Ev Îsayê ji we
berbi ezmanê ve hate hilatin, we
çawa çûyîna wî yî ezman dîtibin,
dê ûsa jî were!

*Matiyas li dêvila Cihûda tê bijartin*
M.Sil 16,33

12 Wê gavê ew ji Çiyayê ku jê
re Zeytûnê tête gotin vegeriyan
Orşelîmê; ew çiya qasî rêya rojek
Sebtê[3] nêzîkî Orşelîmê ye. 13 Û
dema ketin hundir[4], çûn qatê jorîn
yê mala ku li wê dimînin; Pêtrûs,
Yûhena, Aqûp û Andrêyas, Fîlîpûs
û Tûmas, Bartolomeyo û Meta,
Aqûpê Lawê Alfay û Şîmûnê
Welatparêz û Cihûdayê Lawê Aqûp.
14 Vana hemûyan, bi pîrekan û bi

[1] Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Lûqa.
[2] Cuda nebin.
[3] An jî: Ya ku kîlometrekê ji Orşelîmê ve dûr e.
[4] Dema vegeriyan malê, an jî: Hatin.

dayika Îsa Meryem û bi birayên wî
re di nav yekitiyek bêkêmasî de bi-
domî dua dikirin.
15 Di wan rojan de Pêtrûs, di
nava civakekî hema hema ji sed û
bîst birayan ve ava bûyî de rabû û
got: 16 Birano, hewce dikir ku ev
nivîsa, ya Ruhê Pîroz, di derheqê
Cihûdayê ji kesên ku Îsa girtine
re rêberiyê kiriye de ji berê ve, ji
devê Dawid ve têgihandiye biha-
ta cîh. 17 Ji ber ku ew yekî ji me
hatibû hesibandin û di vê xizmetê
de cîhê xwe girtibû.
18 Niha vî zilamî, bi mişeya xe-
rabiyê zeviyekî stend û serberjêr
ket û ji navînê ve qelişî û hemû
rêviyên wî rijiyan. 19 Û hemû
kesên ku li Orşelîmê dijîn, bi vêya
dizanin; ûsa ku, di zimanê wan de
ji wê zeviyê re: Akeldama, yanê,
Zeviya Xwînê, tête gotin.
20 Ji ber ku di Pirtûka Zebûran de
hatiye nivîsandin:
Bila xaniyê wî vala bête hiştin û
kesî ku di tê de rûnê dê tune be[1].
Û: Bila kesekî din karmendiya wî
rahêje[2].
21 Niha di hemû dema ku Xu-
dan Îsa diket û derdiket nav me
de, 22 ji dema vaftîza Yehya dest
pê bike, heta roja ku ew ji nava
me, bi jor ve hate hilatin, yek ji
zilamên ku di rêhevaltiya me de
bû, hewce dike ku bi me re bibe
şahdeyê vejîna wî.
23 Û wan du kesî, Ûsivê bi navê
Yûstûs ve tête zanîn û navlêka
wî Barsaba ye û Matiyas pêş ve
ajotin. 24 Û wan dua kirin û go-
tin: Ya Xudan, tu ku, bi dilê hemû
mirovan ve dizanî, te kîjanî ji van
her duyan hilbijart, wî nîşan bide
ku, 25 bila di vê xizmet û wezî-
feya şagirtiyê de, cîhê ku Cihûda
ji bo here cîhê xwe berda bigire!
26 Û wan ji bo vana pişkê avêtin,
pişk ji Matiyas re ket û ew beşdarî
yanzdeh şagirtan bû.

*Hatina Ruhê Pîroz*

Yow 3,1-5; Met 3,11; Yû 7,37-39; 14,16-17.26; 1.Kor 12,13

2 Dema Roja Pentîkostê hat, ew
hemû li cem hev civiya bûn.
2 Nişka ve ji ezman, dengekî mîna
bayekî dijwar di bîr de tîne, hat û
mala ku lê ne bitûmî dagirt. 3 Û
dîtin ku tiştekên mîna zimanên
ji agir belav bûn û daketin ser
hemûyan. 4 Û ew hemû bi Ruhê
Pîroz ve tijî bûn û bi zimanên bi-
yanî yên ku Ruh wan dide axaf-
tinê, dest bi axaftinê kirin.
5 Di wê demê de li Orşelîmê,
Cihûdên oldar yên ji her nete-
weyên ku di bin ezman de ne,
rûdiniştin[3]. 6 Û dema ev deng hate

1 Zebûr 69:25
2 Zebûr 109:8
3 Li wê derê diman, hebûn.

bihîstin, gel li hev civiyan û ecêb
man; ji ber ku her yekî dibihîstin
ku ew bi zimanê wan ve diaxifin.
7 Di nav şaş û metaliyê de hemû-
yan ji hev û din re digotin: A vay,
hemû ev kesên ku diaxifin ma ne
Celîlî ne? 8 Û çawa dibe ku em
her yek bi zimanên dayika xwe
ve dibihîzin? 9 Em, Partî, Medî,
Elamî û yên li Mezopotamyayê,
li Cihûstanê û Kapadokyayê, li
Pontûsê û Asyayê, 10 li Frîgya û
Pamfîlyayê, li Misirê û Lîbyayê,
yên nêzîkî herêma Kîrênê dijîn
û mêvanên Romayî yên him ji
derûnî Cihûd û him jî yê vegeri-
yane ser Cihûdiyê, 11 Kirêtayî[1] û
Ereb, dibihîzin ku karên Xwedê,
yên mezin bi zimanê me ve têne
axaftin!
12 Û hemû di nav heyranekiyê de
ji hev û din re bi gotina: Divê ev
çi be? dudilî dikirin. 13 Lê belê
kesên din, bi gotina: Vana bi xem-
ra şêrîn ve tijî bûne! tinazê[2] kirin.

*Axaftina Pêtrûs*

14 Lê belê Pêtrûsê bi Yanzdehan
ve rabû ser pêlan û bi dengekî bi-
lind ji wan re got: Ya Cihûdno û
hemûyên ku li Orşelîmê rûdinin,
bila ev ji aliyê we ve bête zanîn û
guh bidin gotinên min! 15 Ji ber
ku van zilamana, mîna ku hûn di-
fikirin ne serxweş in; ji ber ku saet
hîn sisiyê rojê ye! 16 Lê belê ev
ya ku bûye, bi navgîniya peyxam-
ber Yowêl ve hatiye têgihandin:
17 Û di rojên dawîn de dê wusa
bibe ku, Xwedê dibêje, ez ê ji
Ruhê xwe ve birijînim ser hemû
mirovan; dê law û qîzên we pey-
xambertiyê bikin û dê ciwanên
we xewn û xeyalan bibînin û dê
kalepîrên we jî xewnan bibînin.
18 Di wan rojan de bi ser qûlên
xwe ve û bi ser cariyên xwe ve, ez
ê ji Ruhê xwe ve birijînim û ew ê
dê peyxambertiyê bikin.
19 Û ez ê li jor, li ezman nuwa-
zeyan û li jêr, li rûyê erdê nîşanan,
hêlmên xwîn û agir û dûhê bi-
dim. 20 Berî ku roja Xudan, ew
roja mezin û bi rewnaq were, dê
roj vegere tariyê û heyv vegere
xwînê. 21 Û wusa bibe ku, her
kesên ku bangî navê Xudan bikin,
dê xelas bibin[3].
22 Ya mêrên Îsraêlê, van gotin-
an guhdarî bikin: Îsayê Nisretî,
zilamê ku, ji aliyê Xwedê ve, bi
karên bi qudret, mûcîzet û nuwa-
zeyên ku Xwedê bi navgîniya wî,
di nav we de kiriye, hatiye tesdîq
kirin, çawa ku, hûn bi xwe jî diza-
nin; 23 wekî bi miraza Xwedê ya
muqedder û bi ilmê wî yê bêpêşî,
bi dest ve hatiye dayîn, we wî bi

---

[1] Giritî.
[2] Qerf kirin.
[3] An jî: Li ber Xudan bigerin. Yowêl 2:28-32

destê gunehkaran ve bi xaçê ve
mix kirin û kuştin.
24 Xwedê dawî da êşên mirina
wî û wî vejand; ji ber ku ji ali-
yê mirinê ve girtî mabûna wî ne
mimkûn bû. 25 Lewma Dawid ji
bo wî dibêje: Min Xudan her tim
li pêşiya xwe dît, ji ber ku ew li
aliyê minî rastê ye, ez nalerizim.
26 Ji bo vê yekê dilê min geş û
zimanê min zehf kêfxweş bû;
wekî din, dê bedena min jî di nava
kêfxweşiyê de bijî. 27 Ji ber ku
tuyê canê min li warê miriyan ne-
terikîne û Pîrozê xwe ji rizandinê
re bernede. 28 Te rêyên jiyanê
nîşanî min da; tuyê bi rûyê xwe
min bi kêfxweşiyê ve dagire[1]!
29 Birano, divê ji we re, bona
bapîrê mezin Dawid bi eşkeretî
bête gotin ku: Ew him mir, him
hate binaxkirin û gora wî heta îroj
li cem me ye. 30 Niha, ji ber ku
ew peyxamberek bû û dizanîbû,
Xwedê jê re sond û qesem kiriye
ku dê yekî ji bera werta wî li ser
texta wî deyne rûniştinê, 31 ji berê
ve dît û bi gotina; ew ne li warê
miriyan ve hate berdan, ne jî be-
dena wî rizandinê dît, di derheqê
vejîna Mesîh de got. 32 Xwedê,
vî Îsayî vejand û em hemû şahdê
vêya ne. 33 Niha bi destê Xwe-
dê yê rastê ve hatiye bilind kirin,
ji Bav ve wada Ruhê Pîroz sten-
diye û tiştê ku hûn dibînin û di-
bihîzin rijand. 34 Ji ber ku Dawid
hilnekişiyaye ezmên, lê belê ew
bi xwe dibêje:
Xudan ji Xudanê min re got:
35 Heta ku ez neyarên te ji lingên
te re pêlik deynim[2]; li rastê min
rûnê[3].
36 Niha, bi vî awayî bila hemûya
mala Îsraêlê bi rastî jî vêya biza-
nibin ku; Xwedê, ev Îsayê ku we
xaç kir, kiriye him Xudan, him jî
Mesîh!

*Reaksiyona li dijî axaftinê*

Yû 16,8; K.Şa 4,32-37

37 Lê belê gava wan vana bihîs-
tin, dilê wan weke derzî derzî
bûbe; ji Pêtrûs û şagirtên din re
gotin: Birano, ma em çi bikin?
38 Pêtrûs jî ji wan re got: Bona ku
gunehên we bêne efû kirin, tobe
bikin, bila her yekî ji we bi navê Îsa
Mesîh ve vaftîz bibe; bi vî awayî
hûn ê xelata Ruhê Pîroz bistînin.
39 Ji ber ku wad, ji we re û ji za-
rokên we re û ji hemû kesên li dûr
re ne û bona her kesên ku Xudan,
Xwedayê me bang bike re ye.
40 Û wî wekî din hîn bi gellek go-
tinan şahdeyî da û wan îkaz kir û
got: Xwe ji vê nifşeya rêşaş ve xe-
las bikin! 41 Yên guh dan gotinên

1 Zebûr 16:8-11
2 An jî: Li bin lingên te raxim.
3 Zebûr 110:1

wî vaftîz bûn û wê rojê nêzîkê sê
hezar can beşdarî wan bûn[1]. 42 Û
wan di hînkariya şagirtan de, di
hevbeşiyê de[2], di nan parî kirinê
de û di duayê de dom dikirin.

*Yekîtiya di nava bawerkiran de*

43 Tirs ket her canî û bi navgîniya
şagirtan ve gellek mûcîzet û nu-
waze dihatin ava kirin. 44 Hemû
bawerkiran li cem hev diman û
her tiştî bi şirîkantî par dikirin;
45 wan mal û milkên xwe difiro-
tin û wan li gor motajiyê belavî
her kesî dikirin. 46 Û ew her roj li
Perestgehê diciviyan, li malan nan
dişkenandin û bi kêfxweşiyê û bi
sadeyiya dil ve xwarinê dixwarin.
47 Pesnê Xwedê didan, eciban-
dina hemûya gel qezenc kiribûn.
Xudan jî her roj, kesên ku nû xelas
bûne tevî wan dikir.

*Başkirina parsekê kûd*

K.Şa 4,9-22; Îşa 35,6; Îbr 2,3-4

3 Pêtrûs û Yûhena di saeta
nehemîn ya wexta ku dua ki-
rinê ye de, diçûn Perestgehê. 2 Û
mirovekî, ji dayîkbûyînê ve kûd
bû dihat birin, bona ku ji kesên di-
kevin Perestgehê parsê bixwaze,
her roj wî dianîn û datanîn cem
Deriyê Perestgehê ku jê re: Ya
Xweşik tête gotin. 3 Û wî dema
ku dît Pêtrûs û Yûhena dikevin
Perestgehê, ji wan sedeqe xwest.
4 Pêtrûs bi Yûhena re li wî nihêrt
û got: Li me binihêre! 5 Û zilam
bi hêviya ku tiştekî ji wan ve bis-
tîne, bala xwe da wan.
6 Lê belê Pêtrûs got: Zêr û zîvê
min nîne, lê belê ez, yê bi min re
heye didim te: Bi navê Îsa Mesîhê
Nisretî rabe û bimeşe! 7 Û bi destê
wî yî rastê girt û wî rakir; wê demê
lingên wî û hestiyên pahniyên wî
quwetê dîtin[3]. 8 Tûl da û rabû ser
pêlan, dest bi meşê kir; bi meş û
tûlbûnê û bi pesnvedana Xwedê,
bi wan re ket Perestgehê. 9 Hemû
gel wî di meşandin û pesnvedana
Xwedê de dîtin. 10 Û wan jî wî
nas kirin, ew zilamê ku di deriyê
Xweşik yê Perestgehê de bona
parsê rûdinê ev bû û ji ber ya ku
ji wî re bûye, bi şaşî û metaliyê ve
tijî bûn.

*Pêtrûs dîsa diaxife*

K.Şa 4,8-12; 2,22-36; 5,30-32

11 Û gava ku hîn zilam bi Pêtrûs û
Yûhena ve digirt; hemû gel di nava
şaşiyekê de, li cîhê ku bi navê:
Eywana Silêman tête binav kirin,
ber bi wan ve baz dan. 12 Dema
Pêtrûs vêya dît; bangî gel kir: Ya
zilamên Îsraêl, çima hûn bi vêya
şaş man? An jî wekî ku me bi hêz

[1] Beşdarî Civakê bûn.
[2] An jî: Beşdarî, şirîkayî.
[3] Ling û pêlên zilam baş bûn.

karê ku bûye Xwedê bilindtir di-
kirin. 22 Ji ber, temenê zilamê ku
li ser wî mûcîzeta şifê çêbûbû,
çelî derbas kiribû.

*Bawerkir bona wêrînê dua dikin*

Met 18,19-20; Ef 6,18-20; Kol 4,2-4

23 Paşî ku ew serbest hatin ber-
dan, vegeriyan cem hevalên xwe
û hemû tiştên ku serokên kahîn-
an û kalepîran ji wan re gotine
têgîhandin wan[1]. 24 Û dema wan
vana bihîstin, bi hev re deng ji
Xwedê re bilind kirin û gotin: Ya
Xudan, Xwedayê ku erd û ezman
û behrê û hemûyên di nava wan
de afirandiye tu yî. 25 Te bi nav-
gîniya Ruhê Pîroz, ji devê bapîrê
me Dawid ve got: Çima netewe
hêrs bûn û gelan sazûmanên vala
ava kirin?
26 Qiralên rûyê erdê rêz bûn[2] û
rêvebiran, li dijî Xudan û Mesîhê
wî, hatin cem hev[3].
27 Belê, bi rastî jî Hêrodês û Pon-
tiyûs Pîlato, di vî bajarî de bi gelê
Îsraêl û neteweyan ve yek bûn
û li dijî qûlê te Îsayê ku te mesh
kiriye, civiyan. 28 Her tiştên ku
bi hêz û xwestina te, te ji berê ve
bi xwe qirar dabû, anîn cîh. 29 Û
niha, ya Xudan, li gefên[4] wan bi-
nihêre! Hêzê bide qûlên xwe ku,
bila biwêrin gotinên te bibêjin;
30 bona bi navê qûlên te yî Pîroz
Îsa, başkirina nexweşan, bona
afirandina nuwaze û mûcîzetan
destê xwe dirêj bike!
31 Û piştî ku wan dua kirin, cîhê
ku lê civiyabûn hejiya; hemû bi
Ruhê Pîroz ve tijî bûn û bi me-
tirsî gotina Xwedê digotin.

*Bawerkir her tiştên xwe par dikin*

K.Şa 2,44-47; 1.Yû 3,16-18;
Lûq 12,33-34; 2.Kor 8,13-15; 8,7-9

32 Civaka bawerkiran yek dil û
yek can bû û tu kes, bona tiştekî
ku xwediyê wê ye nedigot: Ev ya
min e; lê belê her tişt ji bo wan
hevpar bû. 33 Û şagirtan, ji vejîna
Xudan Îsa re, bi awayekî bi ban-
dûr şahdeyiyê dikirin û lutfa[5] me-
zin li ser hemûyan bû. 34 Ji ber ku
di nav wan de tu kesî xizan tune
bû; lewma hemû kesên xwedî zevî
an jî xwedî xanî, vana difirotin û
berdêla vana dianîn 35 û li ber
lingên şagirtan datanîn û ev jî ji
her kesî re, li gor motajiya wî kesî
dihat par kirin.
36 Zeviyekî Ûsivê Qibrisî, zilamê
Lêwiyî yê ku ji aliyê şagirtan ve
bi navê Barnabas (ku bê vergeran-
din, tê mana: Lawê Xemrevînê)
têtê gotin û bîranîn hebû 37 û wê
firot, pere anî û danî li ber lingên
şagirtan.

1 Ji wan re gotin.
2 Rêz girêdan.
3 Civiyan, Zebûr 2:1-2
4 Tehdîdê...
5 Xêr, say, kerem, an jî: Qencî.

*Hananya û Safîra*

1.Tîm 6,9-10; Yeşû 7,1-26

5 Lê belê zilamekî ku bi navê
Hananya ve tête nasîn tevî
pîreka xwe Safîra, milkekî firot,
2 wekî hayê pîreka wî jî hebe ji
qîmeta wê hinekî ji xwe re veqe-
tand û yên din bir û danî li ber
lingên şagirtan.
3 Lê belê Pêtrûs got: Hananya,
çima Îblîs dilê te tijî kir, ûsa ku,
te derewan ji Ruhê Pîroz re got û
qismek ji berdêla zeviyê ji xwe re
veqetand? 4 Ma çawa ku dima,
ji te re nedima? Û paşî ku te wê
firot, ma ne di bin serweriya te
de bû? Çawa bû ku te vî tiştî xist
dilê xwe? Te ne ji mirovan re, lê ji
Xwedê re derew kir!
5 Dema Hananya van gotinan bihîst,
ket erdê û can da. Û tirsek mezin ket
ser hemû kesên ku bihîstine. 6 Xort
rabûn, wî bi kefen kirin û derxistin
ji derve û binax kirin.
7 Û wusa bû ku, hema qasî bi
navberiya sê saetî pîreka wî jî, ji
tiştê ku bûyiye bêhay ket hundir.
8 Pêtrûs ji wê re: Ji min re bibêje,
ma we zeviyê bi vê berdêla firo-
tin? pirsî.
Wê jî got: Belê, bi vê berdêlê!
9 Lê belê Pêtrûs ji wê re got: Bona
Ruhê Xudan biceribînin, çawa bû
ku we di nava xwe de yekgotinî
kirin? A vay, dengê lingên yên
mêrê te binax kirin li ber derî ye[1],
dê te jî bibin derve! 10 Ew jî hema
li ber lingên Pêtrûs ket û can da û
gava xort ketin hundir dîtin ku ew
miriye û wê birin derve û li cem
mêrê wê binax kirin. 11 Û tirsa
mezin ket ser hemûya Dêrê[2] û
hemûyên ku van tiştan bihîstine.

*Şagirtan gellek kesî baş dikin*

Îbr 2,3-4

12 Bi destên şagirtan ve, di nava
gel de pirr mûcîzet û nuwazeyan
dihatin afirandin û hemû pev re,
li Eywana Silêman bûn. 13 Gel
hurmetek mezin ji wan re diki-
rin, lê belê dîsa jî ji yên din kesek
nediwêriya ku tevî wan bibe;
14 lê belê hîn gellek zilam û
pîrekên ku bawerî anîne, beşdarî
Xudan dibûn; 15 wusa ku, dema
Pêtrûs derbas bibe, qet nebe bona
siya wî yekî ji wan ve bi sî bike,
yên nexweş derdixistin kûçan û
datanîn ser doşeg û sekûyan. 16 Ji
aliyên bajarên li dora Orşelîmê ne
jî, nexweşan û yên ji ruhê xerab
ve êşê dikişînin anîn û civiyan[3];
hemûyên wan şifê dîtin.

*Zordestiya li Şagirtan hate kirin*

17 Serokkahîn û hemûyên bi wî
re, yên bi çavnebariyê ve tijî bûn

[1] Di derî de ye.
[2] Civaka bawerkiran.
[3] An jî: Li Orşelîmê civiyan.

ku, ji mezheba Sadûqiyan bûn
18 û dest avêtin ser şagirtan û wan
avêtin girtîgeha dewletê. 19 Lê
belê milyaketekî Xudan, bi şev
deriyên zîndanê vekir û wan der-
xist derve û got: 20 Herin, bike-
vin Perestgehê û hemû gotinên vê
jiyana[1] bigihînin gel! 21 Û wan
gava vêya bihîstin, hîn roj dihilat
ketin Perestgehê û dest bi ders-
danê kirin. Û dema Serokkahîn û
yên bi wî re ne, hatin, bona civînê
bangî Civata Netewî û hemû ka-
lepîrên gelê Îsraêlê kirin û bona
anîna wan, zilam şandin girtîgehê.
22 Lê belê dema karmend hatin,
ew di zîndanê de nedîtin. Şunda
vegeriyan, agahiyê têgîhandin û
gotin: 23 Me girtîgehê zexm girtî
û nobedaran li ber deriyan sekinî
dîtin; lê belê gava vekirin, me li
hundir tu kesî nedîtin! 24 Fer-
mandarê parazkirê Perestgehê û
serokên kahînan, dema van gotin-
an bihîstin şaş û metal man, mi-
raq kirin ku ka dê dawiya vî karî
bigihêje ku.

*Şagirt Rastiya Xwedê dibêjin*

K.Şa 4,5-12; 4,18-20

25Wê demê zilamekî hate cem
wan, bi gotina: Binihêrin, zilamên
ku we avêtibûn girtîgehê, di Pe-
restgehê de dersê didin gel! aga-
hiyê da wan. 26 Li ser vêya fer-
mandar bi karmendan çûn û wan
bêyî zordayînê anîn; ji ber ku bi
gotina; em ê bêne recimandin, ji
gel ve ditirsiyan.
27 Û ew anîn û derxistin ber Ci-
vata Netewî û Serokkahîn pirsi-
yariyê li wan kir û got: 28 Bona
ku hûn bi vî navî nedin hînkirin,
me temmiyek qenc ji we re kirin
û a vay, we bi hînkariya xwe ve
Orşelîmê tijî kirin û hûn di vê nêta
de ne ku xwîna vî zilamî bi ser me
ve bînin!
29 Lê belê Pêtrûs û şagirtan ber-
sivê dan û gotin: Hewce dike
ku mirov, ji mirovan zêdetir, ji
Xwedê re îtaet bike! 30 Xwedayê
bapîrên me, Îsayê ku we bi darê
ve daliqandin û kuştin, vejand.
31 Xwedê bi destê xwe yî rastê,
wî bi Serok û Xelasker bûnê ve
bilind kir, da ku, bila tobe kirin û
bexşandina gunehan bide Îsraêlê.
32 Em şahdeyê van tişta ne û
Ruhê Pîroz yê Xwedê dide kesên
ku ji wî re îtaet dikin jî şahde ye.

*Pêşniyaza Gamalyel*

Zeb 37,32-33; M.Sil 21,1

33 Lê belê dema wan vêya bihîs-
tin, zehf hêrs bûn û xwestin ku
şagirtan bikujin. 34 Lê belê Fêrî-
siyekî birêziya hemûya gel qezenc
kiriye û mamosteyê zagonê ye ku,
navê wî Gamalyel e, di Civata Ne-
tewî de rabû ser pêlan û emir da
ku şagirtan demekî kurt derxînin

---

1 Jiyana nû.

derve 35 û wî ji wan re got: Ya
mêrên Îsraêlê, ji ber tiştê ku hûn
di derheqê van zilaman de li ser
kirinê ne, xwe biparêzin! 36 Ji
ber ku berî van rojan Tevdas, xwe
wekî ku tiştekî be da xuya kirin û
serî hilda; qasî çar sed mirovî jî
tevî wî bûn; ew bi xwe hate kuştin
û hemûyên ji wî re îtaet kiribûn
belav bûn û tune bûn. 37 Paşî wê
Cihûdayê Celîlî, di rojên jimartinê
de derket qadê, gellek mirovî xapandin
û li pey xwe xistin; ew jî
helaq bû û hemûyên ji wî re îtaet
kiribûn hatin belav kirin. 38 Û
niha ez ji we re bibêjim: Dev ji
van zilaman berdin û wan berdin
ku, hûn nebin yên li dijî Xwedê jî
cengê dikin, ji ber ku, ger ev nêt,
an ev kar ji mirovan be, dê xera
bibe; 39 lê belê ger ji Xwedê be,
bona xerakirina wan hêza we qîm
nake! 40 Û wan şîreta wî qebûl kirin
û paşî ku bangî şagirtan kirin û
li wan xistin, bona ku bi navê Îsa
ve nebêjin temmî li wan kirin û
wan berdan.
41 Bi vî awayî, ew bi kêfxweşiya,
ji ber ku ew bona wî navî liyaqî
heqaretê hatine dîtin, ji ber Civata
Netewî ve derketin. 42 Û her
roj di Perestgeh û malan de dev
ji dersdanê û ji belav kirina Mizgîniya
di derheqê Îsa Mesîh de
bernedan.

*Heft Alîkar*

2.Mûs 18,13-26; 1.Tîm 3,8-13

6 Di wan rojên ku şagirt[1]
zêde dibûn de, ji Cihûdên
bi zimanê Grekî diaxifîn, li dijî
Îbraniyan miremir çêbû; ji ber ku
di alîkariya rojane de li jinebiyên
wan ve nedihat nêrîn. 2 Û li ser
vêya Donzdehan, civata şagirtan
bangî cem xwe kirin û gotin: Dev
ji gotina Xwedê berdan û ji sifran
re xizmet kirina me ne qenc e.
3 Bo vê sedemê, ya birano, ji nava
xwe heft kesê birêz, yên bi Ruh
û zaniyariyê ve tijî hilbijêrin; em
wan bona vî karî wezîfedar bikin.
4 Em jî di duayê û xizmeta gotinê
de bi xîret bidomînin!
5 Û vê gotina ji hemû civakê re
xweş hate dîtin û wan Steyfanê
zilamek bi bawerî û Ruhê Pîroz
ve tijî û Fîlîpûs û Prokorûs û Nêkanor
û Tîmon û Parmenas û Nîkolayê
Antaqyayî yê vegeriyaye
ser Cihûdiyê bijartin û 6 derxistin
ber şagirtan; şagirtan jî piştî ku dua
kirin, destê xwe danîn ser wan.
7 Û gotina Xwedê belav dibû û li
Orşelîmê hejmara şagirtan zehf
zêde dibû û gellekê kahînan jî ji
baweriyê re îtaet dikirin.

*Steyfan tê girtin*

Lûq 21,14-15; Yû 15,18-21

8 Steyfanê bi xêr û bi qudretê
ve tijî, di nava gel de nuwaze û
mûcîzetên mezin diafirand. 9 Lê

[1] Şagirtên Îsa Mesîh.

belê hinek endamên kenişta bi
navê kenişta Lîbertiyan[1] tête nasîn
û hinek kesên ji Kîrênê û Îsken-
deriyê û Kîlîkyayê û ji Wilayeta
Asyayê rabûn û bi Steyfan re dest
bi keftûleftê kirin 10 û hêz neanîn
ku li ber zaniyarî û Ruhê di axaf-
tina wî de bisekinin. 11 Wê gavê
zilaman xapandin û vana: Li dijî
Mûsa û Xwedê kufirkirina wî me
bihîstin! gotin.
12 Û wan gel û kalepîran û alimên
zagonê kişkişandin û çûn ew pê
girtin û derxistin pêşiya Civata
Netewî. 13 Û şahdeyê derewçîn
danîn û vana gotin: Ev zilama
dev ji axaftina gotinên li dijî wê
derê pîroz û zagonê ve bernade!
14 Ji ber ku, me gotina wî ya:
Dê Îsayê Nisretî vir xera bike û
kevneşopên Mûsa daye me bigu-
herîne, bihîstin! 15 Û gava hemû
kesên li Civata Netewî rûniştîbûn,
li wî nihêrtin, wecê wî mîna wecê
milyaketekî dîtin.

*Axaftina Steyfan*

7 Serokkahîn got: Ma ev tiştan
wusa ne?
2 Wî jî got: Birano û bavno,
guhdarî bikin! Dema hîn bapîrê
me Birahîm li Mezopotamyayê
bû, berî ku li Haranê bi cîh bibe,
Xwedayê Mezin[2] xuyayî wî bû 3 û
ji wî re got: Ji welatê xwe û ji cem
merivê xwe derkeve û here welatê
ku ez ê nîşanî te bidim! 4 Wê demê
ew ji welatê Kildaniyan derket û
li Haranê bi cîh bû. Û piştî mirina
bavê wî, Xwedê wî ji wir girt û anî
vî welatê ku niha hûn li wê dijîn.
5 Û li vir jê re bi mîrasî cîhekî lingê
xwe deyne jî neda wî; lê belê çaxa
hîn zarokê wî tunebû, wir, bi milkî
ji wî re û werta wî re dayînê wad kir.
6 Xwedê ûsa got: Dê neviyên te, li
welatek xerîb, li biyaniyê bijîn û
çar sed salî bi dîlitî bên şuxulandin
û muamela xerab bibînin. 7 Û
Xwedê got: Ez ê netewa ku ji wan
re dîlitiyê bikin, bidim ceza kirin
û paşî vêya dê ji wir derkevin û li
vê derê ji min re peristinê bikin.
8 Û peymana sunetê da wî û bi vî
awayî Birahîm bû bavê Îshaq û wî
di roja heyştan de sunet kir û Îshaq
bû bavê Aqûp, Aqûp jî bû bavê
donzdeh bapîrên mezin.
9 Û bapîrên mezin çavnebariyê li
Ûsiv kirin, wî bi dîlitî firotin Mi-
sirê û Xwedê bi wî re bû 10 û wî
ji hemû tengasiyên wî ve xelas kir
û li ber qiralê Misirê Fîrawûn xêr
û zaniyarî da wî; wî jî ew li ser
Misirê û hemûya mala xwe kir
parêzger.
11 Û xela li hemû welatê Kenan
û Misirê ve xist û tengasiyên
mezin dest pê kirin û bapîrên me
nikarîbûn xwarinê bidîtana. 12 Lê

1 Azadkaran.
2 Bilind.

belê dema Aqûp bihîst ku li Misirê
zad heye, cara pêşîn bapîrên me
şand. 13 Û di cara duwemîn de,
Ûsiv kîbûna xwe ji birayên xwe
re got û werta Ûsiv ji Fîrawûn re
eşkere bû. 14 Ûsiv jî xeber şand û
bavê xwe Aqûp û hemû merivên
xwe, heftê û pênc canî da bang
kirinê. 15 Û Aqûp çû Misirê
û ew jî û bapîrên me jî mirin.
16 Û cesedên wan anîn Şekemê
û xistin goristana Birahîm, ya ku
li Şekemê, ji Lawên Hamor ve bi
bihayek pera[1] ve stendibû.
17 Lê belê dema wexta rastbû-
na soza ku Xwedê ji Birahîm re
daye nêzîk bû, li Misirê hejmara
gel zehf zêde bûbû; 18 heta wê
gavê ku, qiralekî din yê Ûsiv nas
nedikir, li Misirê derket ser textê.
19 Ev qiral, ji nîjada me re fenekî
kir û bona ku nejîn ji bo zarokên
xwe bavêjin derve, zehmetê da
bapîrên me. 20 Mûsa di wê demê
de hate dinê û zehf xweşik[2] bû û
ew sê meh di mala bavê xwe de
hate xwedî kirin. 21 Û gava wî
avêtin derve; qîza Fîrawûn wî dît
û ji xwe re kir zarok û wekî lawê
wê be, wî mezin kir. 22 Û Mûsa
di hemû beşên îlmê Misiriyan
de hate perwerde kirin û him di
gotinê de û him jî di lêkerê de bi
qudret bû.
23 Lê belê dema sala çelan tijî
kir, xwesteka dîtina rewşa birayên
xwe, lawên Îsraêlê ket dilê wî.
24 Û gava ku wî dît, neheqiyê li
yekî ji wan ve dikin, wî parast û bi
kuştina Misiriyê ku neheqiyê dike,
tola yê belengaz stend. 25 Wî zen
dikir ku; birayên wî fêhm kirine
ku, dê Xwedê bi destê wî ve xe-
lasiyê bide wan; lê belê wan fêhm
nekirin. 26 Dotira rojê dema wan
keftûleftê dikirin, xwe nîşanî wan
da û xwest ku wan li hev bîne û
got: Efendîno, hûn bira ne; çima
hûn neheqiyê li hev û din dikin?
27 Lê belê kesê ku neheqiyê li
cîranê xwe dikir, wî bi alîkî ve tan
da û got: Ma kî te li serê me kiri-
ye rêvebir û dadger? 28 Ma mîna
ku te do yê Misirî kuşt, tu dixwazî
min jî bukujî? 29 Li ser vê gotina,
Mûsa reviya û li welatê Mîdyanê
bû mêvan, li wir bû bavê du lawî.
30 Û gava çel sal tijî bû, li çola
Çiyayê Sînayê, di nava agirê sin-
cikekê[3] dişewite de, milyaketek ji
wî re xuya bû. 31 Û gava Mûsa
dît, bi vê dîtinê ve şaş ma û dema
bona ku hîn jî ji nêzîka ve lê bi-
nihêre, nêzîk bû; dengê Xudan
hat: 32 Ez Xwedayê bapîrên te,
Xwedayê Birahîm û Îshaq û Aqûp
im! Mûsayê bi tirs dilerziya, ne-
wêribû ku lê binihêre.

---

[1] An jî: Bi perê zîv.
[2] Ji bo Xwedê xweşik bû.
[3] Deviyek.

33 Lê belê Xudan ji wî re got: Çarixên xwe ji lingên xwe derxîne! Ji ber, cîhê ku tu li ser sekiniye, axa pîroz e! 34 Bi rastî jî min tengasiya netewa xwe yî li Misirê ye dît û nalînên wê bihîstim û bona xelaskirina wan daketim; niha were, ez ê te bişînim Misirê!
35 Ev Mûsaya, yê ku bi gotina: Kî te li serê me kiriye rêvebir û darazkir? nexwestin, Xwedê bi destê milyaketê ku di nava sincikê de ji wî re xuyanî bûye, wî bi rêvebirî û xelaskerbûniyê ve şand.
36 Wî zilama li Misirê û li Behra Gewez[1] û çel sal li çolê bi çêkirina nuwaze û mûcîzetan wan derxist.
37 Yê ku ji lawên Îsraêlê re got: Dê Xwedê, ji nava birayên we peyxamberekî mîna min derxîne[2], ew Mûsaya ye. 38 Milyaketê ku li Çiyayê Sînayê jê re gotiye û yê ku bi bapîrên me re di Dêra çolê ye de bû ew bû; ew ku, bona bigêhîne me, gotinên zindî stend.
39 Û bapîrên me nexwestin ku ji wî re îtaet bikin; wî red kirin û bi dilê xwe vegeriyan Misirê[3]. 40 Û ji Harûn re gotin: Îlahên pêşengiyê ji me re bikin, çêbike; ji ber, em nizanin ku ji wî Mûsayê me ji warê Misirê ve derxistiye re çi bûye[4]!
41 Û di wan rojan de golikek çêkirin; ji senemê re qurbanê pêşkêş kirin û bi karên destên xwe ve kêfxweş bûn. 42 Û Xwedê wecê xwe ji wan ve zivirand û wan, bona qûlitiyê ji cismên ezmanî re bikin terikand; mîna ku di pirtûka peyxamberan de hatiye nivîsandin: Ya mala Îsraêlê, li çolê di çel salî de, ma we boraq û qurbanan bona min pêşkêş kirin? 43 We çadira Moloq û stêrka îlahê xwe Refan, bona ku ji wan re peristinê bikin, senemên ku we çêkiribûn kişandin[5]. Û ez ê we ji Babîlê wêdetir bajom[6].
44 Bona li gor mînaka ku wî dîtiye ava bike, mîna yê ku bi Mûsa re axifiye emir dayiye, Çadira Şahdeyiyê li çolê bi kalikên me re bû. 45 Kalikên me bi dorê stendin û tevî Yeşû, wî anîn milkên neteweyan; Xwedê wan neteweyan heta rojên Dawid ji ber kalikên me ve qewirand. 46 Dawidê ecibandina Xwedê qezenc kir û xwest ku bona Xwedayê Aqûp sitargehekê ava bike. 47 Lê belê Silêman ji wî re xaniyek ava kir.
48 Çi heye ku, Yê Bilind, li xaniyên bi destan ve hatine ava kirin rûnanê; mîna ku peyxamber dibêje: 49 Ezman textê min û rûyê erdê pêlikên lingên min in. Ma hûn ê xaniyekî çawa ji min re ava bikin? Xudan dibêje; an jî

1 Sor.
2 (5.Mûsa 18:15)
3 Bêriya vergera Misirê kirin.
4 (2.Mûsa 32:1)
5 Bar kirin.
6 Amos 5:25-27

cîhê ku ez lê rawestim ku der e?
50 Ma yê ku vana hemûyan ava
kiriye, ne destê min in[1]?
51 Ya zilamên ku histuyên wan
hişk, dil û guhên wan bêsunet
in! Hûn her tim li dijî Ruhê Pîroz
disekinin; mîna ku bapîrên we ki-
rine, hûn jî dikin! 52 Ma bapîrên
we zordestiyê li kîjan peyxamberî
nekirin ku? Û kesên hatina wî Sa-
lihî ji berê ve têgîhandin, kuştin;
hûn jî niha bûn xayîn û qesasên
wî! 53 Hûn ku, we zagonê mîna
ku milyaketan rêz kirine girtin û
pê negirtin.

*Bi recimandinê ve kuştina Steyfan*

Met 23,34-36

54 Dema wan van tiştan bihîstin,
zehf hêrs bûn û li ser wî diranan
qîriçandin. 55 Lê belê wî, bi Ruhê
Pîroz ve tijî çavên xwe wergerand
ezmanan û li wir rewnaqiya Xwe-
dê û Îsayê li rastê Xwedê ve se-
kinî dît 56 û got: A vay, ez vebûna
ezmanan û sekina Lawê Mirov li
rastê Xwedê dibînim!
57 Lê belê ew bi dengê bilind
qêriyan û guhên xwe girtin û gişt
pev re êrîşî ser wî kirin. 58 Û wî
avêtin dervê bajêr û dan ber kevi-
ran û şahidan xeftanên xwe danîn
ber lingê ciwanekî ku, navê wî
Saûl bû. 59 Û dema Steyfan bi
gotina: Ya Xudan Îsa, ruhê min
bistîne! dua dikir, wî dan ber ke-
viran. 60 Û wî çok da û bi denge-
kî bilind got: Ya Xudan, vî gunehî
li wan bar meke[2]! Û piştî ku wî
vêya got, kete xewê[3].

*Saûl jî kuştina Steyfan tesdîq kiribû*

K.Şa 11,19-21; Gal 1,13-14

8 Û Saûl bi kuştina wî ve razî
bûbû. Wê rojê li Orşelîmê, li
dijî Dêrê dema zordestiyek giran
dest pê kir; xeynî şagirtan, hemû
belavî her aliyê Samîriyê û Cihûs-
tanê bûn. 2 Û zilamên ji Xwedê
ditirsin, Steyfan binax kirin û
bona wî şînekî mezin girtin. 3 Lê
belê Saûl, mal bi mal digeriya,
Dêrê perîşan dikir û mêran û pîre-
kan kaş dikir û davêt girtîgehê.

*Fîlîpûs li Samîriyê*

K.Şa 1,8

4 Êdî yên ku belav bûne, mizgî-
niya gotinê kirin û geriyan. 5 Û
Fîlîpûs çû bajarekî Samîriyê û ji
wan re dest bi danasîna Mesîh kir.
6 Û gava gel nuwazeyên ku çê-
kirine bihîstin û dîtin, gişt pevra
guh dan tiştên ku ji aliyê Fîlîpûs
ve tên gotin. 7 Ji ber ku ji nava
gellek kesî ruhên xerab bi bang
kirina dengekî bilind derketin;
gellek kesê felc û kûd hatin baş

---

[1] Îşaya 66:1-2
[2] Vî gunehî nevêje ser wan!
[3] Gihaşt xewê.

kirin. 8 Û li wî bajarî kêfxweşiyek
mezin çêbû.

*Sêrbaz Şîmûn*

9 Lê belê li bajêr bi navê Şîmûn
yekî sêrbaziyê dike û xwe mîna
zilamekî mezin nîşan dide û bi
vî awayî gelê Samîriyê şaş dike
hebû 10 û bi gotina: Qudreta
Xwedê, ya ji wê re dibêjin Mezin,
ev e; ji biçûk heta mezin hemûyan
bala xwe didan wî. 11 Ji ber ku di
demeke dirêj de ye, wan bi sêrba-
ziya xwe şaş û metal hiştibû, bala
xwe didan wî. 12 Lê belê dema
bi gotinên Fîlîpûs yê Mizgîni-
ya di derheqê Serweriya Xwedê
û navê Îsa Mesîh de bawer bûn,
zilam û pîrekan hatin vaftîz kirin.
13 Şîmûn bi xwe jî bawerî anî û
vaftîz bû û her tim li cem Fîlîpûs
ma û dema çêkirina nîşanên ser-
xweza û mûcîzetên mezin dît, şaş
û metal ma.
14 Û şagirtên li Orşelîmê ne, dema
bihîstin ku gelê Samîriyê gotina
Xwedê qebûl kirine, Pêtrûs û
Yûhena ji wan re şandin. 15 Vana
jî gava gîhaştin wir, bona ku Ruhê
Pîroz bigirin, ji bo wan dua kirin;
16 ji ber ku ew hîn daneketibû ser
wan yekî jî; tenê bi navê Xudan
Îsa ve vaftîz bûbûn. 17 Wê demê
şagirtan destên xwe danîn ser wan,
wan jî Ruhê Pîroz girtin.
18 Û dema Şîmûn dît ku, bi vê
rêxistina dest danîna şagirtan ve
Ruhê Pîroz girtin, wî pere ji wan
re anî û got: 19 Vê qudretê bidin
min jî ku, ez her destê xwe deynim
ser kî, bila Ruhê Pîroz bigire!
20 Lê belê Pêtrûs ji wî re got:
Bila perê te bi te re helaq bibe!
Ji ber ku te got qey ez ê xelata
Xwedê bi peran ve bi dest bixim!
21 Di vî karî de ne para te heye û
ne jî nisîbê te heye; ji ber ku dilê
te li ber Xwedê ne rast e! 22 Niha
ji vê xerabiya xwe ve tobe bike
û li ber Xudan bigere, dibe ku ev
fikra dilê te ji te re bête bexşandin.
23 Ji ber ku, ez te di tahliya zirave
de û pêwendiya rêşaşiyê de dibî-
nim!
24 Şîmûn jî bersiv da û got: Bona
min hûn li ber Xudan bigerin ku
bila ji van gotinên we, tu yek neyê
serê min!
25 Paşî ku wan li gor gotina Xu-
dan şahdeyiyê kirin û gotin, li gel-
lek gundê Samîriyê bi waz kirina
Mizgîniyê vegeriyan Orşelîmê.

*Fîlîpûs û wezîrê qiralîça Hebeşîstanê*

1.Qir 8,41-43; Îşa 56,3-7;
Rom 9,30-33; 10,14-15

26 Lê belê milyaketekî Xudan ji
Fîlîpûs re axiftî û got: Rabe, here
rêgeha ji başûr ve, ji Orşelîmê ve
dadikeve Gazayê, ew der çol e.
27 Ew jî rabû û çû û a vay, zila-
mek ji Hebeşîstanê[1], wezîrê Kan-

1 Êtiyopî.

dakî ya qiralîça Hebeşîstanê, yekî
hatiye xesandin yê berpirsiyarê
hemû xezîneyên wê ye, bona pe-
ristinê hatibû Orşelîmê 28 û ew
şunda vedigeriya û di erebeya
xwe de rûniştî, Îşaya peyxamber
dixwend. 29 Û Ruh ji Fîlîpûs re
got: Here, bigihêje wê erebê!
30 Fîlîpûs jî baz da cem û bihîst
ku ew Îşaya peyxamber dixwîne
û got: Gelo tu tiştê ku dixwîne,
fêhm dikî?
31 Wî jî got: Heta ku mirovek rê
nîşanî min nede, ez ê çawa bika-
ribim ku fêhm bikim? Û bona ku
Fîlîpûs siwar be û li cem wî rûne
rica kir. 32 Û cîhê ku ji kitêbê ve
dixwend ev bû:
Mîna mîhan ji serjêkirinê re hate
birin û çawa ku li ber kesên hirî
diqusîne berxik dengê xwe derne-
xe, ûsa devê xwe venake.
33 Dema hate biçûk dîtin, dadî ji
wî ve hate parastin[1].
Dê kî nîjada wî di bîr de bîne?
Ji ber ku, li rûyê erdê dawî dan
jiyana wî[2].
34 Yê xesandî jî bersivê da Fîlîpûs
û got: Ez ji te rica dikim, peyxam-
ber vêya ji bo kî dibêje? Ji bo
xwe, an ji bo yekî din? 35 Fîlîpûs
jî devê xwe vekir û ji vî nivîsê ve
dest pê kir û Mizgîniya di derheqê
Îsa de têgihand wî.
36 Û dema di rê de diçûn, hatin
cem avekê û yê xesandî got: A
vay, av! Ma çi astengî li ber vaftîz
bûna min heye? 37 Û Fîlîpûs got:
Ger tu bi hemûya dilê xwe bawer
bikî caiz e! Û wî bersivê da û got:
Ez baweriyê tînim ku, Îsa Mesîh
Lawê Xwedê ye!
38 Û wî emir da ku erebe bê sekin-
andin; Fîlîpûs û yê xesandî her du
jî ketin nav avê û Fîlîpûs wî vaftîz
kir. 39 Û dema ji avê ve derketin,
Ruhê Xudan Fîlîpûs girt û bir û
yê xesandî êdî ew nedît, ji ber ku
bi kêfxweşiyê ve bi rêya xwe ve
çû. 40 Lê Fîlîpûs jî li Aşdotê hate
dîtin û heta ku bigihêje Sezariyê
digeriya û li hemû bajaran mizgî-
niya Încîlê dikir[3].

*Îsa bi Saûl ve xuyanî dibe*

K.Şa 22,3-16,9,20; Gal 1,11-16;
1.Tîm 1,12-16

9 Lê Saûl, hîn li dijî şagirtên Xu-
dan ve hilma qesas û gefê dida,
çû cem Serokkahîn 2 û dixwaze
bila mêr bibe, an jin bibe, her yê
ku ji vê Rêya ne bibîne, bona ku bi
girêdanê bîne Orşelîmê, ji wî ve ji
keniştên Şamê re nameyan xwest.
3 Û dema wî rê girt û nêzîkî Şamê
bû, wusa bû ku, nişka ve ronahi-
yek ji ezman ve hat, dora wî ronî
kir. 4 Û ew kete erdê û bihîst ku

[1] Veşartin.
[2] Îşaya 53:7-8
[3] Da bihîstin.

dengek ji wî re dibêje: Saûl! Saûl!
Çima tu zilmê li min dikî?
5 Wî jî got: Ya Xudan, tu kî yî?
Û wî got: Ez Îsayê ku tu zilmê lê
dike me. Bi dijrabûnê mesasê[1] tu
xesarê[2] didî xwe! 6 Wî bi lerizîn û
bi tirs got: Ya Xudan, tu dixwazî
ez çi bikim? Û Xudan got: Rabe û
bikeve bajêr, dê hewcedariyê ki-
rinên te ji te re bê têgîhandin!
7 Zilamên ku bi wî re rêwîtiyê di-
kirin, bê ziman li wir sekinîbûn;
ji ber ku wan deng bihîstin jî, lê
belê tu kesî nedîtin. 8 Û Saûl ji
erdê rabû, dema çavên xwe vekir,
tu kesek nedît[3]. Wan jî bi destên
wî girtin û birin Şamê. 9 Û wî
heta sê rojî nikarîbû bidîta, ne
tiştekî xwar û ne jî vexwar.
10 Û li Şamê şagirtek bi navê Ha-
nanya hebû û di dîtinekê[4] de Xu-
dan ji wî re got: Hananya! Û wî jî
got: Ez li vir im, ya Xudan! 11 Û
Xudan ji wî re got: Rabe û here
kuça ku navê wê Kuça Rast e û
li mala Cihûda, zilamekî Tarsûsî
ku, navê wî Saûl e bigere. Ji ber
ku a vay, ew dua dike! 12 Û di
dîtina xwe de[5] dîtiye ku mirovek
bi navê Hananya hatiye cem wî û
bona çavên wî dîsa bibînin destê
xwe daniye ser wî.
13 Û Hananya bersivê da: Ya
Xudan, di derheqê vî zilamî de,
li Orşelîmê ji pîrozên te re çiqas
xerabiyan kiriye, ji gellek kesan
bihîstim! 14 Û bona li vir heçî
kesên ku navê te bang dikin girê
bide, ji serokên kahînan ve raye-
dariya wî heye!
15 Lê belê Xudan ji wî re got:
Here, ji ber ku ew, bona ku navê
min ji neteweyan re, ji qiralan re
û ji lawên Îsraêl re bide bihîstin,
hacetekî bona min hatiye bijartin
e! 16 Ji ber, ez ê nîşanî wî bidim,
hewce dike ku ew di oxra navê
min de çiqasî tengasiyê bikişîne.
17 Û Hananya çû, ket wê malê û
destên xwe danî ser Saûl û got:
Birayê Saûl, dema tu dihat vir,
Xudanê di rê de ji te re xuyanî
bûyî, Îsa, bona ku çavên te vebin
û tu bi Ruhê Pîroz ve tijî bibî,
min şand! 18 Hema ji çavên wî
tiştên mîna perdê ketin û wî dîsa
dît 19 û rabû vaftîz bû, xwarinê
xwar û quwetê dît.

*Saûl li Şamê û Orşelîmê*

Û Saûl, çend rojan li cem şagirtên li
Şamê ne ma. 20 Hema li keniştan bi
gotina, Îsa Lawê Xwedê ye, wazê
da. 21 Û hemûyên ku dibihîstin,
ecêb diman û digotin: Ma ev ne ew
zilamê ku kesên li Orşelîmê qala
vî navî dikirin perîşan kiriye yî û
bona ku wan bi girêdayî ji serokên

1 Şiva sertûj.
2 Ziyan, zerar.
3 An jî: Tu tiştek nedidît.
4 Di xewn û xeyalekê de.
5 Di xewn û xeyala xwe de.

kahînan re bibe nehatibû vir?
22 Lê belê Saûl hîn zêde xwurt
dibû; di derheqê Mesîhiya wî de
delîlan nîşan dida û Cihûdên li
Şamê dijîn şaş û metal dihiştin.
23 Piştî ku di navberê de pirr roj
derbas bûn; Cihûdan, bona ku wî
bikujin, fenekî ava kirin. 24 Lê
belê nûçeya di derheqê fena ku
ava kirine de gîhaşt Saûl. Bona ku
wî bikujin, wan bi şev û roj çav-
nêriya deriyan dikirin. 25 Lê belê
şagirtên wî, bi şevê wî girtin û ji
dîwêr derbas kirin û di nava zem-
bîlekî de dahelandin û daxistin.
26 Dema Saûl gîhaşt Orşelîmê,
şuxulî ku beşdarî şagirtan bibe;
lê belê hemû ji wî ditirsiyan û ba-
wer nedibûn ku ew şagirt e. 27 Lê
belê Barnabas wî girt û anî cem
şagirtan û ka di rê de Xudan çawa
dîtiye û Xudan çawa jê re gotiye û
li Şamê bi navê Îsa ve çawa bi ce-
saret wazê daye, ji wan re gihand.
28 Û ew, li Orşelîmê bi wan re
derdiket û diketê û bêtirs di navê
Xudan Îsa de waz dida. 29 Û bi
Cihûdên zimanên wan Grekî ne
re jî diaxifî û guftegoyê dikir; lê
belê wan pêşniyariya kuştina wî
dikirin. 30 Û dema birayan hînî
vêya bûn, wî birin Sezariyê û
şandin Tarsûsê.
31 Bi vî awayî hemû Dêrên li
Cihûstanê, Celîlê û Samîriyê ne,
gîhaştin dilxweşiyê û di tirsa Xwe-
dê de dijiyan û bi alîkariya Ruhê
Pîroz ve, bi hejmarî mezin dibûn.

*Eynêyas û Tabîtha*

32 Û wusa bû ku, gava Pêtrûsê li
her aliyê digeriya, serîkî da pîro-
zên li Lîddayê dijîn jî. 33 Li wir
zilamekî bi navê Eynêyas e dît
ku, kûd bûbû û heyşt sal bû ku di
nava livînan de bû. 34 Pêtrûs ji
wî re got: Eynêyas, Îsa Mesîh te
baş dike; rabe û livînên xwe bide
hev! Û ew jî hema rabû. 35 Û
hemû kesên li Lîddayê û Şaronê
ve rûdiniştin, wî dîtin û vegeriyan
Xudan.
36 Li Yafayê şagirteke pîrek, ya
navê wê Tabîtha ye hebû; (ku
wergera wê, tê mana: Xezalê[1]);
karên qenc û xêratên vê pîreka,
gellek bûn. 37 Û wusa bû ku,
ew di wan rojan de nexweş ket
û mir û piştî ku wê şuştin, danîn
odeyek qatê jorîn. 38 Ji ber ku
Lîdda nêzîkî Yafayê ye, şagirtên
ku bihîstin Pêtrûs li wê derê ye,
du kesî ji wî re şandin û gotin: Bê
wext derbaskirinê were cem me û
li ber wî geriyan.
39 Pêtrûs jî rabû û bi wan re çû.
Û dema ew hat, wî derxistin oda
qatê jorîn; hemû pîrekên bî, bi
girî li dora wî ve civiyan, kinc û
lîbasên dema Xezal bi wan re bû
dirûtibû nîşanî wî dan. 40 Lê belê
Pêtrûs her kesî derxist derve, çok

---
[1] An ji:Dorkas.

da û dua kir; pişt re vegeriya miri-
yê û got: Tabîtha, rabe! Wê jî ça-
vên xwe vekir û dema wê Pêtrûs
dît, rabû û rûnişt. 41 Pêtrûs destê
xwe dirêjî wê kir û wê rakir ser
pêlan û bangî pîrozan û pîrekên bî
kir, wê bi saxî da wan. 42 Lê belê
li hemûya Yafayê ev têzanîn bû û
gellekan bawerî bi Xudan anîn.
43 Û wusa bû ku, Pêtrûs demekî
dirêj li Yafayê, li mala debaxekî
navê wî Şîmûn e ma.

*Baweriya Kornêlyûs*

Rom 9,30-33; 1,16-17

10 Li Sezariyê, li Tabûra ku
jê re Îtalyanî digotin, zi-
lamekî bi navê Kornêlyûs hebû;
2 zilamekî bawermend[1] û bi hemû
maliyên xwe re yekî ji Xwedê di-
tirsiya bû; zehf sedeqe dida gel
û her tim ji Xwedê re dua dikir.
3 Di nêzîkî saeta nehemîn ya
rojê de di xewn û xeyalekî de, bi
eşkeretî dît ku milyaketekê Xwe-
dê hate cem wî û ji wî re got: Ya
Kornêlyûs!
4 Û wî di nava tirsê de çavên xwe
ber bi wî rakir û got: Çî ye, ya
Xudan?
Milyaket jî ji wî re got: Dua û se-
deqeyên te, ji bona di bîranînê de
gîhaştin qatê Xwedê! 5 Niha bona
tu bangî Şîmûn ku, ji wî re Pêtrûs
dibêjin, bikî, zilaman bişîne Yafa-
yê. 6 Ew li mala Şîmûnê debax,
yê ku mala wî li qeraxa behrê ye
mêvan e!
7 Dema milyaketê ku jê re digot
çû, wî ji xulamên xwe bangî du
kesî û ji yên ku her tim xizmeta
wî dikin re bangî leşkerek bawer-
mend[2] kir 8 û piştî ku her tiştî ji
wan re got, wan şand Yafayê.

*Xewn û xeyala Pêtrûs*

Ef 2,11-14

9 Dotira rojê dema wan rê girtibûn
û nêzîkî bajêr bûbûn, saet li dora
şeşan Pêtrûs, bona dua bike derket
ser xanî. 10 Dema ew zehf birçî bû,
xwarinê xwest û gava hîn xwarinê
amade dikirin, ew ji xwe ve derbas
bû[3]. 11 Û wî dît ku ezman vedibe
û firaqakî mîna çarşefekî mezin,
ji çar alî ve hatiye berdan û dadi-
keve rûyê erdê; 12 di hundirê wê
de bi her tewrî heywanên li rûyê
erdê ve dijîn, yên çarling, marîjok
û civîkên ezmanan hebûn. 13 Û
dengekî ji wî re got: Rabe, Pêtrûs,
serjêke û bixwe!
14 Lê belê Perûs got: Tu carî
nabe[4], ya Xudan! Ji ber ku min
tu carî tiştekî rêze, an jî mindar
nexwariye! 15 Deng dîsa, cara
duwemîn ji wî re got: Tiştên ku
Xwedê paqij kiriye, tu rêze meke!

1 Oldar.
2 Oldar, an jî: Yekî ji Xwedê ditirsiya.
3 Ket xewn û xeyalê.
4 Haşa.

16 Û vêya sê carî çêbû û firaq
hema bi ezman ve hate hilatin.
17 Pêtrûs di nava şaşiyê de bû; hîn
difikirî ku ev xewn û xeyala ku
dîtiye tê çi manê, a vay, zilamên
ku ji aliyê Kornêlyûs ve hatibûn
şandin, mala Şîmûn pirsîbûn û
hatibûn ber deriyê derve xwe
spartibûn. 18 Û wan bang kirin û
pirsîn; ka Şîmûnê bi navê Pêtrûs
ve tête nasîn, li vê malê mêvan e.
19 Û gava Pêtrûs hîn li ser xewn
û xeyalê difikirî, Ruh ji wî re
got: A vay, sê meriv li te digerin!
20 Lê belê rabe, dakeve jêr, qet
ecêb nemîne û bi wan re here; ji
ber ku min wan şand!
21 Pêtrûs daket jêr û ji zilaman re
got: A vay, mirovê ku hûn li wî
digerin ez im; gelo sedema hatina
we çî ye?
22 Wan jî gotin: Mirovekî ser-
pel, di navê Kornêlyûs de, rast û
ji Xwedê ditirse û bi hemû gelê
Cihûd ve qenc tê zanîn; milyake-
tekî pîroz emir da wî ku, bila te
bangî mala xwe bike û guh bide
gotinên te. 23 Li ser vêya wî wan
bangî hundir kir û kir mêvan.

*Kornêlyûs tobe dike*

Lûq 24,47; K.Şa 1,8; Ef 2,11-19; 3,6

Dotira rojê ew rabû, bi wan re
derket rê û hinek birayên li Yafa-
yê ne bi wî re çûn. 24 Û dotira
rojê gîhaştin Sezariyê. Kornêlyûs
jî mirovên xwe û hevalên xwe
yî nêzîk civandibû, li benda wan
bû. 25 Û gava Pêtrûs ket hundir,
Kornêlyûs hat pêşwaziya wî û
xwe avêt ber lingên wî û secde
kir. 26 Lê belê Pêtrûs wî rakir û
got: Rabe; ez jî mirovek im!
27 Û dema ew bi wî re diaxifî,
ket hundir, dît ku gellek mirov
civiyane 28 û ji wan re got: Hûn
dizanin ku, yekî Cihûd, ger bi mi-
rovekî ji neteweyek din re têkili-
yan deyne, an jî here cem wî li dijî
kevneşopa me ye; lê Xwedê nîşanî
min daye ku, divê ez ji qet kesekî
re rêze, an jî mindar nebêjim. 29 Ji
bo vêya, dema hatim bang kirin,
bêyî li dijsekinê hatim. Niha ez di-
pirsim: Gelo we bi çi armancî min
dan anîn?
30 Kornêlyûs jî got: Çar roj berê,
heta di van deman de ez rojî bûm,
di saet nehan de, li mala xwe dua
dikirim. Û a vay, zilamek kincên
wî dibiriqe li ber min sekinî 31 û
got: Kornêlyûs, dua te hate bihîstin
û sedeqeyên te li ber Xwedê hatin
bi bîr anîn! 32 Niha bişîne Yafayê,
bangî Şîmûnê ku bi navê Pêtrûs ve
tête nasîn, bike; ew li qeraxa behrê,
li mala Şîmûnê debax mêvan e.
33 Li ser vêya, min hema ji te re
şandin û te jî bi hatina xwe qenc
kir. Niha em hemû bona her tiştê ku
Xudan emir daye te guhdarî bikin,
li vir, li ber Xwedê civiyane[1]!

[1] Amade ne.

34 Pêtrûs jî devê xwe vekir û got:
Ez bi rastî fêhm dikim ku, Xwedê
li şexsan nanihêre; 35 lê belê ji her
netewê, yê ku ji wî ditirse û dadiyê
dike, ji wî re hêja ye! 36 Kelama
ku bi navgîniya Xudanê her kesî
Îsa Mesîh ve ji lawên Îsraêlê
re bi mizgînî kirina xweşiyê ve
şandiye; 37 paşî vaftîza ku Yehya
waz kiriye, tiştê ku ji Celîlê dest
pê kiriye û li hemûya Cihûstanê
ve bûye, 38 yanê, ka Xwedê Îsayê
Nisretî bi Ruhê Pîroz û bi qudretê
ve çawa mesh kiriye û ew jî çawa
bi qencî kirinê, bi şifê dayîna
hemûyên ku ji aliyê Îblîs ve tahdê
dîtine digeriya, hûn pê dizanin; ji
ber ku Xwedê bi wî re bû.
39 Û ji hemû tiştên ku li welatê
Cihûdan û Orşelîmê kirine re,
em şahde ne û wî bi dar ve daliqandin
û kuştin. 40 Xwedê, di
roja sêwemîn de wî vejand û bi
eşkeretî wî da xuyakirin; 41 ne ji
hemûya gel re, tenê ji şahdeyên
ku pêşiyê ji aliyê Xwedê ve hatine
bijartin re, ji me re, ji yên piştî ku
ji miriyan vejiya, bi wî re dixwarin
û vedixwarin re. 42 Û wî emir
da me ku, em ji gel re şahdeyiyê
bikin û waz bidin ku Darazkirê
mirî û zindiyan, yê ji aliyê Xwedê
ve hatiye wezîfedar kirin, ew e.
43 Hemû peyxamber, di derheqê
wî de şahdeyiyê dikin, gunehê
her kesê ku bi wî bawerî anîne, bi
navê wî tête bexşandin.
44 Hîn Pêtrûs van gotinan digot,
Ruhê Pîroz daket ser her kesê
ku gotinê[1] dibihîzin. 45 Û hemû
bawerkirên sunetkirî[2] yên bi
Pêtrûs re hatine, ecêb man, ji
ber ku xelata Ruhê Pîroz li ser
neteweyan jî rijiyabû. 46 Ji ber,
wan dibihîstin ku, ew bi zimanan
diaxifin û Xwedê bilindtir dikin.
Wê gavê Pêtrûs bersiv da: 47 Vana
jî mîna me Ruhê Pîroz stendine;
ma bona ku vana vaftîz nebin, kî
dikare avê qedexe bike? 48 Û wî
emir da ku ew bi navê Îsa Mesîh
vaftîz bibin. Wê gavê wan rica ji
wî kirin ku, hîn çend rojan li cem
wan bimîne.

*Alîgirtê sunetê Pêtrûs rexne dikin*

11 Şagirt û birayên li Cihûstanê
ne, bihîstin ku neteweyan
jî gotina Xwedê qebûl kirine.
2 Û dema Pêtrûs çû Orşelîmê,
alîgirtê sunetê wî rexne kirin 3 û
gotin: Tu çûyî mala bêsunetan û
te bi wan re xwarinê xwar!
4 Lê belê Pêtrûs ji serî ve dest pê
kir û bûyeran yek û yek ji wan re
got: 5 Ez li bajarê Yafayê bûm û
min dua dikir. Ez ji xwe derbas
bûm û min xewn û xeyalekî dît;
min dît ku ji ezman firaqekî mîna
çarşefekî mezin, ji çar alî ve hatiye

1 Gotina Xwedê.
2 Cihûd.

berdan û dadikeve heta cîhê min.
6 Dema çavên xwe zîq dam ser û
bi balkêşî li wê nihêrtim û fikirîm,
bi her tewrî heywanên li rûyê erdê
ve dijîn, yên çarling, marîjok û ci-
vîkên ezmanê dîtim. 7 Û dengekî
ku ji min re got: Rabe, Pêtrûs, ser-
jê bike û bixwe! bihîstim.
8 Lê belê min got: Tu carî nabe[1], ya
Xudan! Ji ber ku tu carî tiştekî rêze
an jî mindar neketiye devê min!
9 Û deng dîsa, cara duwemîn ji
ezmanan ve bersiv da: Tiştên ku
Xwedê paqij kiriye, tu rêze meke!
10 Û sê carî vêya bû û her tişt dîsa
ber bi ezman ve hate hilatin.
11 A vay, di wê demê de sê kesên
ji Sezariyê ve ji min re hatine
şandin, hatin û li ber mala ku ez li
wê me, sekinîn. 12 Û Ruh ji min
re got, bê şik û şiphe bi wan re
here. Ev her şeş bira jî bi min re
hatin, em çûn, ketin mala wî zi-
lamî. 13 Û wî ji me re, di derheqê
milyaketê ku di mala wî de seki-
niye de têgîhand û ji wî re gotiye:
Zilaman bişîne Yafayê, Şîmûnê
ku bi navê Pêtrûs ve tête nasîn
bide bang kirin; 14 ew ê ji te re,
gotinên ku tu û hemû maliyên te,
hûn ê bi wan ve xelas bibin, bi-
bêje.
15 Dema min dest bi axaftinê kir,
Ruhê Pîroz mîna ku di destpêkê
de daket ser me, daket ser wan
jî. 16 Wê gavê min ew gotina ku
Xudan gotibû, di bîra xwe de anî:
Yehya bi avê ve vaftîz kir, lê belê
hûn ê bi Ruhê Pîroz ve bên vaftîz
kirin. 17 Niha, dema me bawerî bi
Xudan Îsa Mesîh anî, mîna ku ji
me re bûyî, ger eynî xelatê Xwe-
dê dabe wan jî, ma ez dibûm kî
ku, bikaribim li dijî Xwedê bise-
kinim?

*Bawerkirên li Antaqyayê*

K.Şa 8,1-4; Rom 10,12; Kol 3,11

18 Ew jî paşî ku vana bihîstin,
aş bûn û Xwedê bilindtir kirin û
gotin: Bi vî awayî Xwedê fersen-
da tobe kirinê û gîhaştina jiyanê
daye neteweyan jî.
19 Bawerkirên, li ser zordestiya
bi kuştina Steyfan ve destpêkir
belav bûbûn, çûn heta Fînîkyayê,
Qibrisê û Antaqyayê û gotin tenê
ji Cihûdan re didan bihîstinê.
20 Lê belê hinek zilamên Qibrisî
û Kîrêneyî ên ji nav wan, çûn
Antaqyayê, bi Grekan re dest bi
axaftinê kirin û ji wan re jî miz-
gîna Xudan Îsa gotin. 21 Destê
Xudan bi wan re bû û gellek kes
bawer kirin û vegeriyan Xudan.
22 Nûçeya vana gîhaşt guhê Dêra
ku li Orşelîmê ye û wan Barnabas
heta Antaqyayê şandin. 23 Û dema
ew gîhaşt û xêra Xudan dît, kêfxweş
bû û bona ku ji dil bi Xudan ve girê-
dayî bin, hemûyan teşwîq kir; 24 ji
ber ku ew mirovek qenc û bi Ruhê

[1] Haşa.

Pîroz ve tijî bû û gellek kes beşdarî
Xudan bûn.
25 Û Barnabas, bona li Saûl bi-
gere, çû Tarsûsê û 26 dema ew
dît, wî anî Antaqyayê û wusa bû
ku, ew heta salekî bi Dêra wir ve
hatin cem hev û civakekî mezin
perwerde kirin û navê Mesîhiyan,
cara yekemîn, li Antaqyayê dan
şagirtan.
27 Di wan rojan de hinek pey-
xamber ji Orşelîmê ve hatin An-
taqyayê. 28 Ji vana yekî, navê wî
Agabûs bû, rabû û bi navgîniya
Ruh ve dabihîstin ku dê li hemûya
dinê xelayek dijwar çê bibe; ev jî
di dema qiraletiya Klawdîûs de
bû. 29 Şagirtan biryar dan ku, dê
her kes li gor hêza xwe alîkariyê
ji birayên li Cihûstanê dijîn re
bişînin; 30 vêya jî bi destê Bar-
nabas û Saûl ve ji kalepîran re
şandinê ve anîn cîh.

*Xudan, Pêtrûs ji Girtîgehê xelas dike*

12 Di wê demê de qiral Hêro-
dês, bona xerabiyê bi wan
bike, dest dirêjî hinek kesên ji Dêrê
ne, kir. 2 Û wî Aqûpê birayê Yûhe-
na, bi şûr ve kuşt. 3 Û dema dît ku
Cihûdan ji vêya dilxweş dibin, pêş
ve çû, bi Pêtrûs jî girt. Rojên Nanê
Bêhavên bûn. 4 Û gava Pêtrûs da
girtin, avêt girtîgehê û da destê
çavnêriya çar taxim leşkeran; nêta
wî ew bû ku wî paşî Fisihê[1] derxî-
ne ber gel. 5 Bi vê sedemê, Pêtrûs
di girtîgehê de hate girtin; lê belê
ji aliyê Dêrê ve, bona wî bi xîret ji
Xwedê re dua dikirin.
6 Pêtrûs tam di şeva berî roja ku
Hêrodês wî derxîne navendê de,
bi zincîran ve girêdayî, di nava du
leşkeran de raketîbû û notirvanan
li ber derî li benda girtîgehê bûn.
7 Û a vay, milyaketekî Xudan hate
xuyakirin û di hucrê de ronahiyek
biriqî[2] û wî xwe li sînga Pêtrûs xist[3]
û wî hişyar kir û got: Zû rabe! Û
zincîr ji destên wî ve ketin. 8 Mil-
yaket ji wî re got: Piştika xwe girê
bide û çarixên xwe li pey ke! Û wî
ûsa kir. Û milyaket ji wî re got: Eba
xwe li xwe bike û li pey min were!
9 Û ew li pey wî derket û çû û ni-
zanîbû tiştê ku bi navgîniya mil-
yaket ve bûye rast e, lê digot qey
xewn û xeyalekî dibîne. 10 Nobe-
darên yekemîn û duwemîn derbas
kirin û hatin deriyê hesin yê ku
li bajêr vedibe; derî li ber wan bi
xwe vebû; derketin derve û heta
kuçekê meşiyan û milyaket hema
ji wî cuda bû.
11 Dema hişê Pêtrûs hate serê wî,
got: Ez niha bi rastî dizanim ku,
Xudan milyaketê xwe şand û min
ji destê Hêrodês û ji hemûyên ku

1 Cejna Nanê Bêhavên.
2 Şewle da.
3 Dest da sînga Pêtrûs.

gelê Cihûd hêvî dikirin, xelas kir.
12 Û piştî ku ew hay jê bû, çû mala
Meryemê, mala dayika Yûhenayê
bi navê Marqos tête zanîn; li wir
gellek kes civiya bûn û dua dikirin.
13 Gava Pêtrûs li deriyê derve xist,
keçikekî xizmetkar, bi navê Roda
hate ku guh bidê. 14 Gava ku wê
dengê Pêtrûs nas kir, ji kêfxweşiya
xwe derî venekir û baz da hundir
û got: Pêtrûs li ber derî disekine!
15 Ji wê re gotin: Tu dîn bûyî! Lê
ji ber ku keçik rikand[1], wan jî go-
tin: Dibe ku milyaketê wî be!
16 Lê belê Pêtrûs lêxistina derî
domand û dema wan vekirin û wî
dîtin, ecêb man. 17 Lê belê wî bi
destê xwe, bona bêdeng bimînin
nîşan da wan û Xudan çawa wî ji
girtîgehê derxistiye ji wan re got:
Lê belê wî got: Vana bighînin
Aqûp û birayan! Û ew derket û çû
derekî din.
18 Û gava bû roj, bi gotina Pêtrûs
çi bû, teşqela di nava leşkeran de
ne hindik bû. 19 Hêrodês jî wî da
gerandin, dema ku nedît, nobe-
daran da ber pirsan û bona kuştina
wan emir da. Û ew ji Cihûstanê
ve çû Sezariyê û li wir ma.

*Hêrs û mirina Hêrodês*

M.Sil 16,18; Zeb 37,35-36

20 Hêrodês ji gelên Sûr û
Saydayê re zehf hêrs bûbû; ew
jî yek bûn û hatin cem wî û piştî
ku seramojgarê qiral, Vîlastûs
kişandin aliyê xwe, aşitiyê
xwestin; ji ber ku xwarinên bona
welatê wan, ji welatê qiral ve dihat.
21 Û di roja ku hatibû bijartin de,
Hêrodêsê kincên xwe yî qiralî li
xwe kiriye, li ser texta xwe rûnişt
û axaftinekê ji wan re kir. 22 Û gel
bi qêrîna: Ev ne dengê mirovekî,
dengê Xwedê ye! diqêriyan.
23 Milyaketekî Xudan hema li wî
xist; ji ber ku bilindahiyê nedabû
Xwedê û ji aliyê kurman ve hate
xwarin û can da.
24 Lê belê gotina Xwedê belav bû
û zêde bû.
25 Barnabas û Saûl yên wezîfa
xwe temam kiribûn, Yûhenayê
bi navê Marqos ve tête zanîn jî
girtin cem xwe û ji Orşelîmê ve
vegeriyan.

*Gera yekemîn ya Mizgîniyê*

*Bi wezîfedarkirina Saûl û Barnabas*

Gal 2,7-9

13 Li Antaqyayê, li Dêra ku
li wê derê ye, peyxamber
û mamoste hebûn: Barnabas,
Şîmûnê ji wî re Nîger jî digotin,
Lûkiyosê Kîrênêyî, Menahêmê
bi fermandarê herêmê Hêrodês re
mezin bûyî û Saûl. 2 Dema vana
ji Xudan re peristinê dikirin û ro-
jiyê digirtin, Ruhê Pîroz ji wan re
got: Barnabas û Saûl bona wezîfa
ku min bona wê bangî wan kirine,

[1] Inyad kir.

ji min re cuda bikin! 3 Bi vî awayî
paşî ku rojî girtin û dua kirin, destên
xwe danîn ser wan û şandin.

*Barnabas û Saûl li Qibrisê*

4 Bi vî awayî vana ji aliyê Ruhê
Pîroz bi şandinê ve çûn Sêlêfkeyê
û ji wir jî bi keştiyê derbasî
Qibrisê bûn. 5 Û dema ew gîhaştin
Selamîsê, li kenîştên Cihûdan, dest
bi belav kirina gotina Xwedê kirin.
Yûhena jî di xizmeta wan de bû.
6 Û piştî ku ew li tevahiya giravê
heta Pafosê geriyan, Cihûdekî,
navê wî Baryêşû ye û sêrbaz û
peyxamberek sexte ye dîtin; 7 ev
zilam, walî Sergiyo, yê ku mirovekî
baqil bû, li cem Pawlos bû.
Walî, bangî Barnabas û Saûl kir û
xwest ku gotina Xwedê guhdarî
bike. 8 Çi heye ku sêrbaz Elîmas
(ji ber ku navê wî bi vî awayî têtê
vergerandin) li dijberî wan rabû
û nehişt ku walî baweriyê bîne.
9 Lê belê Saûl, yanê, Pawlos, bi
Ruhê Pîroz ve tije bûyî, çavên
xwe zîq da Elîmas 10 û got: Ya
tu! Zilamê ku bi hemû fenekî û
xerabiyê ve tijî ye; lawê Îblîs,
neyarê her dadiyê; ma tuyê dev
ji çewt kirina rêyên rast yên Xudan,
bernede? 11 Û niha, a vay,
destê Xudan li ser te ye û tuyê
kor bibî û tuyê heta demekê nikaribe
tîrêjên rojê bibînî! Û hema
mij û tarî daket ser wî û çar zivirî
û li yekî bi destê wî bigire û rê li
ber veke geriya. 12 Wê gavê waliyê
ku tiştên bû dît, bi hînkariya
Xudan ve şaş û metal ma û baweriyê
anî.

*Li Antaqyaya Pîsîdyayê*

K.Şa 2,22-36; 7,1-50; 10,36-43

13 Pawlos û hevalên wî ji Pafosê
ve vebûn û hatin Pergê ya Pamfîlyayê;
Yûhena jî, ji wan veqetiya
û vegeriya Orşelîmê. 14 Ew jî ji
Pergê derbas bûn û hatin Antaqyaya
Pîsîdyayê û roja Sebtê ketin
kenîştê û rûniştin. 15 Paşî zagonê
û nivîsê peyxamberan xwendin,
rêvebirên kenîştê ji wan re şandin
û gotin: Birano, ger şîretek ku
hûn bidin gel hebe, kerem bikin,
biaxifin!
16 Wê gavê Pawlos rabû ser
pêlan û bi destê xwe nîşanekî
kir û got: Ya mêrên Îsraêlê û hûn
yên ji Xwedê ve ditirsin; guhdarî
bikin! 17 Xwedayê vî gelê Îsraêlê,
bapîrên me bijart û di dema li warê
Misirê de xerîb bûn gel bilind kir
û bi destê xwe yî xurt wan li wê
derê derxistin. 18 Û li çolê nêzîkî
çel salî, nazkirina wan kişand
19 û wî li welatê Kenanê heft netewe
helaq kir û welatên wan bi
vijagê di nava wan de par ve kir.
20 Û piştî vêya, wî qasî çarsed û
pêncî salî heta dema Samûyêl peyxamber,
darazkiran da wan.
21 Û piştî wê wan qiralekî
xwest, Xwedê jî zilamekî ji eşîra

Benyamînê; Saûlê lawê Kîşê çel salî da wan. 22 Û piştî ku wî ji textê daxist, bona wan Dawid bi qiralî anî serî û di derheqê wî de vê şahdeyiya kir û got: Min Dawidê lawê Îşay, zilamekî li gor dilê xwe dît, dê ew ê bi her xwestinên min bike[1]. 23 Xwedê li gor sozê, ji Îsraêlê re Xelaskerekî ji nîjada vî zilamî, Îsa şand.
24 Berî hatina wî, Yehya ji hemû gelê Îsraêlê re toba vaftîzê waz kiribû. 25 Û dema Yehya dewra xwe temam kir, got: Hûn dibêjin qey ez kî me? Ez ne ew im. Lê belê a vay, li pey min yek tê; ez ne liyaq im ku bendê çarixa di lingê wî de ye vekim!
26 Birano, zarokên ji nîjada Birahîm û yên ji nava we, ji Xwedê ve ditirsin, ev gotina xelasiyê ji we re hate şandin. 27 Ji ber ku yên li Orşelîmê dijiyan û rêvebirên wan wî qebûl nekirin û bi mehkûm kirina wî, gotinên peyxamberan, yên her roja Sebtê tên xwendin anîn cîh. 28 Û di wî de tu sûcê ku mirinê heq kiriye neditin, lê dîsa jî ji Pîlato ve kuştina wî xwestin. 29 Û paşî her tiştên di derheqê wî de hatine nivîsandin anîn cîh, wî ji xaçê ve daxistin û xistin gorê. 30 Lê belê Xwedê, wî ji mirinê ve vejand. 31 Û ew bi rojan ji kesên ku bi wî re, ji Celîlê ve hatine Orşelîmê re xuyanî bû; niha ew li ber gel şahdeyê wî ne.
32 Û em Mizgîniya soza ku daye kalikan ji we re didin bihîstin; 33 Xwedê bi vejandina Îsa ve, soza ku daye kalikên me, bona me yên zarokên wan e aniye cîh; mîna ku di Zebûra duwemîn de jî hatiye nivîsandin:

Tu Lawê min î, îroj ez ji te re bûm Bav[2].

34 Û di derheqê vejandina wî ya ji nava miriyan ku êdî venegere rizandinê de ûsa gotiye:

Ez ê nîmetên pîroz û ewledar, yên Dawid bidim we[3].

35 Û bona vêya, li derekî din jî ûsa dibêje: Tuyê bernade ku pîrozê te rizandinê bibîne[4].

36 Ji ber, piştî ku wî di nifşeya xwe de, li gor miraza Xwedê xizmetê kir, Dawid di xew de çû û tevî bapîrên xwe bû û rizandinê dît. 37 Lê belê ew kesê ku Xwedê wî vejand, rizandinê nedît. 38 Niha birano, bizanibin ku, bexşandina gunehan bi wî ve ji we re tê agah kirin. 39 Û heçî kesê ku bawerî anîne, bi her sûcên ku hûn bi zagona Mûsa ve ji wan pak nabin, dê bi navgîniya wî ve bê pak kirin. 40 Niha bala xwe bidin, bila ev rewşa ku pey-

---

1 1.Samûyêl 13:14; Zebûr 89:20
2 Zebûr 2:7
3 Îşaya 55:3
4 Zebûr 16:10

xamberan qala wê kiriye, neyê
serê we:
41Binihêrin, ya hûn, yên xor
dibînin, şaş bimînin û helaq bibin!
Ji ber ku ez di rojên we de karekî
dikim, karekî ûsa ku, ger yekî ji we
re bibêje, hûn qet bawer nabin[1]!

*Cihûd Mizgîniyê red dikin*

Rom 15,8-13; 15,16-21; 1.Sel 2,14-16

42 Û gava Cihûd ji kenîştê derdi-
ketin, wan[2], bona ku ev gotin di
roja Sebta ku were de ji wan re
bête gotin lava kirin. 43 Û dema
civaka li kenîştê belav bû, gellekên
Cihûdan û yên xerîbî vegeriyane
Cihûdiyê û ji Xwedê re peristinê
dikin li pey Pawlos û Barnabas
çûn û ew jî bi wan re axifîn û wan
teşwîq kirin ku bila di xêra Xwe-
dê de pêdandî bimînin.
44 Di roja Sebta din de, hema
hema hemûyên gelê bajêr, bona
bihîstina gotina Xwedê civiyan.
45 Lê belê dema Cihûdan aja-
weyê dîtin, bi çavnebariyê ve tijî
bûn û li dijî gotinên Pawlos rabûn
û kufr kirin.
46 Lê Pawlos û Barnabas bi ce-
saretê axifîn û gotin: Hewce di-
kir ku me pêşiyê gotina Xwedê
bigîhanda we; madem ku hûn
wê ji xwe davêjin û hûn darazi-
yê didin ku hûn ne liyaqî jiyana
abadîn in, a vay, em jî vedigerin
netewan. 47 Ji ber ku Xudan bi vî
awayî emir daye me:
Min te ji netewan re mîna rona-
hiyê danî ku, tu heta nîçikê rûyê
erdê bona xelasiyê hebe[3]!
48 Û dema neteweyan vêya bihîs-
tin, kêfxweş bûn û gotina Xudan
bilindtir kirin û heçiyên ku bona
jiyana abadîn hatibûn bijartin, ba-
werî anîn.
49 Û gotina Xudan li hemûya
welêt belav dibû. 50 Lê belê
Cihûdan, pîrekên birêz yên peris-
tinê ji Xwedê re dikin û zilamê
pêşhatê bajêr in kişkişandin[4],
bona Pawlos û Barnabas dest
bi rêxistinek zordariyê kirin û
wan avêtin derveyî sînorên xwe.
51 Vana jî toza lingên xwe li dijî
wan dawişandin û çûn Qonyayê.
52 Lê belê şagirtan bi Ruhê Pîroz
û kêfxweşiyê ve tijî bûn.

*Li Qonyayê*

2.Tîm 3,10-12

14 Û li Qonyayê wusa bû ku,
ew pev re ketin kenîşta
Cihûdan, ûsa axifîn ku, him ji
Cihûdan û him jî ji Grekan ve
ajaweyek mezin bawerî anîn. 2 Û
Cihûdên ku bawerî neanîbûn, bi
kişkişandina kesên ji neteweyan,
li dijî birayan hişên wan tevlihev

1 Habaqûq 1:5
2 Mirovên ji neteweyên din, yên ku ne Cihûd in.
3 Îşaya 46:9
4 Fîtandin, fît kirin, an jî: Teşwîq kirin.

kirin. 3 Ew demekê dirêj li wir
man, di derheqê Xudan de bi
wêrekiyê[1] diaxifîn; ew Xudanê
ku, hêza nuwaze û mûcîzet kirinê
da wan û bi vî awayî, rasteqîniya
gotina ku xêra wî daxuyanî dike
kir. 4 Lê belê gelê bajêr bûn du parî
û hinekan bi Cihûdan re, hinekan jî
bi şagirtan re bûn.
5 Gava yên ji Cihûdan û
neteweyan, bona ku wan biêşînin
û bidin ber keviran, bi rêvebirên
xwe re fenekê pêkanîn; 6 hayê
wan ji vê fena çê bû û ew reviyan
bajarên Lîkavonyayê, Lîstra û
Derbê û hawirdorê wan 7 û li wan
deran jî Mizgîniyê belav kirin.

*Li Lîstrayê û Derbê*

8 Li Lîstrayê zilamekî ji bûyînê ve
kûd bû, lingê wî nagire û tu carî
nemeşiyayî rûdinişt. 9 Vî zilamî,
dema Pawlos diaxifî bihîst; wî jî bi
balkêşî li wî nihêrt, dît ku, bona şîfa
dîtinê baweriya wî heye, bi denge-
kî bilind ji wî re got: 10 Rabe, li ser
lingên xwe bisekine! Ew jî ji cîhê
xwe hol bû û meşiya.
11 Û gava gelê ku kirinên Paw-
los dîtin, dengê xwe bilind kirin û
bi zimanê Lîkavonyayê ve gotin:
Îlah ketine cismê mirovan û da-
ketine cem me! 12 Ji Barnabas re
gotin Zêûs û ji Pawlosê pêşengê
axaftinê bû re jî gotin Hermês[2].
13 Kahînê perestgeha Zêûs ya
hema li dervî bajêr e, ga û çelen-
gan anî deriyê bajêr û xwest ku bi
gel re qurbanan pêşkêş bike.
14 Lê belê dema şagirtan, Pawlos
û Barnabas vêya bihîstin, kincên
xwe çirandin û ketin nav ajaweyê,
qêriyan 15 û gotin: Efendîno, hûn
çima tiştên ûsa dikin? Em jî mîna
we mirov in, em xwediyê afirandi-
na mîna we ne û em Mizgîniyê ji
we re tînin ku, hûn dev ji van tiştên
vala berdin û vegerin Xwedayê
zindî, yê ku erd û ezman û behrê
û hemûyên di hundirên wan de
ne, afirandî ye! 16 Di demên der-
basbûnê de wî destûr da ku hemû
netewe di rêyên xwe de herin 17 û
dîsa jî xwe bê şahde nehiştiye; wî
ji me re qenciyê kir; ji ezmanan ve
baranê barand, bi tewr û tewr mêw
û dexlan, demsalan serrast kir û
dilên me bi xwarin û bi kêfxweşiyê
ve tijî kir. 18 Û bi van gotinan jî, bi
zorekê ketin ber gel ku qurbanan ji
wan re pêşkêş nekin.

*Pawlos didin ber keviran*

2.Kor 6,3-10; 11,23-28

19 Lê belê hinek Cihûdên ku ji
Antaqyayê û Qonyayê ve hatin,
gel xapandin û Pawlos dan ber ke-
viran[3]; gotin qey miriye û wî avêtin

[1] Bi cesaret.
[2] Yanê navê wan guhertin.
[3] Recimandin.

derveyî bajêr. 20 Lê belê dema
şagirt li dora wî sekinîbûn, ew rabû
ser pêlan û kete bajêr. Û dotira rojê
bi Barnabas re çû Derbê.
21 Û piştî ku li wî bajarî jî Miz-
gîniyê waz dan û gellek şagirtan
civandin[1]; vegeriyan Lîstrayê,
Qonya û Antaqyayê 22 û hêz dan
canê şagirtan û bona bi baweriyê
ve girêdayî bimînin wan teşwîq
kirin û (ji wan re) divê em ji gel-
lek tengasiyan derbas bibin û tê-
kevin Serweriya Xwedê, digotin.
23 Û piştî ku wan di her Dêrekê
de, bona wan kalepîran bijartin; bi
dua û rojiyê, wan emanetî Xudanê
ku bi wî bawerî anîne kirin.
24 Ew ji Pîsîdyayê ve derbas bûn
û hatin Pamfîlyê. 25 Û paşî li Per-
gê gotinê waz dan, çûn Antalyayê.
26 Û ji wir bi keştiyê, vegeriyan
cîhê ku bona vê wezîfa êdî hati-
ye temam kirin, bi xêra Xwedê ve
hatibûn emanet kirin, Antaqyayê.
27 Dema gîhaştin wir û Dêrê ci-
vandin; ka Xwedê bi navgîniya
wan ve çi kiriye û deriyê baweri-
yê ji neteweyan re vekiriye, gotin.
28 Û bi şagirtan re demekê dirêj
buhartin.

*Civaka li Orşelîmê*

Gal 1,6-7; 2,1-9; 2,15-21; 5,1

15 Hinek kesên ji Cihûstanê
ve hatin, hînî birayan di-
kirin û digotin: Ger hûn li gor
kevneşopa Mûsa sunet nebin,
hûn nikarin xelas bibin! 2 Piştî
ku Pawlos û Barnabas, gellekî bi
wan re ketin guftego û keftûleftê,
wan biryar dan ku, bila Pawlos
û Barnabas, bi hinekê birayan re
ji bona vê pirsa gengeşiyê herin
Orşelîmê cem şagirt û kalepîran.
3 Bi vî awayî, yên ji aliyê Dêrê, ji
rê ve hatin şandin û vegera nete-
weyan daxuyanî kirin û ji Fînîk-
yayê û Samîriyê ve derbas bûn û
kêfxweşiya mezin dan hemû bira-
yan. 4 Û dema gîhaştin Orşelîmê,
ji aliyê Dêrê, şagirtan û kalepîran
ve hatin qebûl kirin û hemû tiştên
ku Xwedê bi navgîniya wan kiri-
ye anîn ziman.
5 Lê belê hinek bawerkirên ji
mezheba Fêrisiyan bûn, rabûn û
gotin: Divê ew bêne sunet kirin û
ji wan re emir bê dayîn ku li gor
zagona Mûsa bikin!
6 Şagirt û kalepîran, bona ku vê
pirsgirêkê biaxifin civiyan. 7 Û
paşî guftegoyekê dirêj bû, Pêtrûs
rabû ser pêlan û ji wan re got: Bi-
rano, hûn dizanin ku, bona nete-
weyan Mizgîniyê pêşiyê ji devê
min bibihîzin û bi wê baweriyê
bînin, Xwedê berî demekî dirêj,
ji nav we min hilbijart. 8 Û Xwe-
dayê ku bi dilan dizane, mîna ku
ji me re kiriye, bi dayîna Ruhê
Pîroz ji wan re jî şahdeyî kir 9 û
wî di nava wan û me de tu cihêti-

1 Gellekan kirin şagirt.

yê nekir, li ser bawerkirina wan,
dilê wan jî safî kir. 10 Niha, hûn
çima nîrekî ku, ne bavên me, ne
jî me karibûn bikişandina, dixin
histuyê şagirtan û Xwedê dice-
ribînin? 11 Lê belê em bawer di-
kin ku em ê jî bi xêra Xudan Îsa
ve mîna wan xelas bibin.
12 Û li ser vêya hemûya civakê
bêdeng bû, dest bi guhdarkirina
Barnabas û Pawlos kirin; wan çi-
qas nuwaze û mûcîzetên ku Xwe-
dê bi navgîniya wan di nav nete-
weyan de çêkiriye, têgihandin[1].
13 Û piştî ku wan axaftina xwe
qedandin, Aqûp dest bi gotinê kir
û got: Birano, min guhdarî bikin!
14 Şîmûn anî ziman ku, Xwedê
ji nava neteweyan, bona netewe-
yekî ji navê xwe re derxîne, cara
yekemîn çawa seredaniya wan ki-
riye. 15 Û gotinên peyxamberan
vana rast dike; mîna ku hatiye ni-
vîsandin: 16 Paşî vêya ez ê vege-
rim û çadira Dawid, ya xerabûyî ji
nû ve ava bikim. Û ez ê xirbên wê
dîsa ava bikim û ez ê wê dîsa ra-
kim ser pêlan. 17 Da ku, mirovên
li paş mayî û hemû neteweyên
navê min li ser wan hatiye bang
kirin, bila li Xudan bigerin.
18 Xudanê ku van tiştana di dest-
pêkê de têgîhandiye, dibêje[2]. 19 Ji
bo vêya, bi min, divê em ji kesên
ji neteweyan vegeriyane Xwedê
ve astengiyê dernexînin; 20 tenê
bona ku bila xwe ji mindariya se-
neman, ji zînayê û ji yê hatiye xe-
niqandinê û ji xwînê ve biparêzin,
ji wan re binivîsînin. 21 Ji ber ku
ji demên kevnar ve, di her rojên
Sebtê de li keniştan tête xwendin,
li her bajarî, wazkirê Mûsa hene.

*Nameya ji bawerkirên Neteweyên din in re*

Kol 1,26-27; Gal 5,1-12

22 Wê çaxê ji hemûya Dêrê û
şagirtan û kalepîran re, zilamên
ku ji xwe ne, yanê, ji yên ku di
nava birayan de pêş ve tên, Cihû-
dayê ku jê re Barsaba tête gotin û
Sîlas bijartin û bi Pawlos û Bar-
nabas re şandina Antaqyayê qenc
xuyanî bû. 23 Bi navdîtiya wan
ve wusa nivîsandin: Şagirt û ka-
lepîr û birayan, ji birayên me yî
ji neteweyan in û li Antaqyayê, li
Sûriyê û li Kîlîkyayê ne re silavê
dikin! 24 Me bihîst ku; ji nav me
hinek kes hatine cem we, bi go-
tinên xwe aramiya we xera kirine
û dilê[3] we tevlihev kirine; me wan
neşandibûn. 25 Ji bo vêya, me bi
yek rayê qirar dan ku, em ê zila-
man hilbijêrin û bi xoşewîstê me
Barnabas û Pawlos ve bişînin cem
we; 26 ew zilamên ku di oxra Xu-

1 Neql kirin, gotin.
2 Amos 9:11-12
3 Can.

danê me Îsa Mesîh de canê xwe ji
çav avêtine nin. 27 Ji ber vê yekê
me Cihûda û Sîlas ji we re şandin
û dê ew van tiştan bi dev bighînin
we. 28 Ji ber ku ji Ruhê Pîroz û ji
me re qenc xuya kir ku, xeynî van
tiştên hewce ne zêdetir, em tu tiştî
li we nekin bar: 29 Xwe ji tiştên
ku ji pûtan re hatine qurban kirin,
ji xwînê û ji yê hatiye xeniqan-
dinê û ji zînayê biparêzin; ger hûn
ji vana birevin, hûn ê qenc bikin.
Di xweşiyê de bin!

*Bawermend ji ber Nameyê kêfxweş dibin*

30 Bi vî awayî ew derketin rê û
çûn Antaqyayê û Civakê civandin
û nameyê dan. 31 Û dema wan jî
vêya xwendin, ji ber xemrevîniyê
kêfxweş bûn. 32 Cihûda û Sîlasê
ku bi xwe jî peyxamber bûn, bi
gellek gotinan birayan teşwîq kirin
û quwet dan wan. 33 Û piştî de-
mekê li wir man, bona ku vegerin
cem yê wan şandine, ji aliyê bira-
yan ve bi dilxweşî hatin bi rê kirin.
34 Lê belê li wir mayîn ji Sîlas re
qenc hate xuyanî kirin. 35 Lê belê
Pawlos û Barnabas li Antaqyayê
man, bi wekî din gellekan re ders
dan û gotina Xudan waz dan.

*Gera duwemîn ya Mizgîniyê*

36 Paşî çend rojan, Pawlos ji
Barnabas re got: Niha em vege-
rin hemû bajarên ku me li wan
gotina Xudan dane bihîstin û em
seriyekî li birayan bixin, çawane
em bibînin! 37 Barnabas, dixwest
ku Yûhenayê bi navê Marqos
ve tête nasîn jî bi xwe re bibe.
38 Lê belê Pawlos, li cîh nedît
ku, zilamê li Pamfîlyayê wan se-
rerû hiştiye û domî wezîfê neki-
riye bi xwe re bibe. 39 Ji ber vê
yekê keftûleftek dijwar derket,
wusa ku, ji hev û din veqetiyan
û Barnabas Marqos girt cem xwe
û bi keştiyê, ber bi Qibrisê ve çû.
40 Lê belê Pawlos Sîlas bijart û
paşî ji aliyê birayan ve li xêra Xu-
dan hate emanet kirin, derket rê.
41 Û li herêmê Sûrî û Kîlîkyayê
geriya û Dêran[1] zeximand.

*Pawlos Tîmoteyos bi xwe re dibe*

16 Û Pawlos hate Derbê û
Lîstrayê jî û a vay, li wê
derê şagirtekî lawê pîrekek Cihûd,
ya ku bawermend e, lê bavê wî
jî Grek e, bi navê Tîmotêyos e
hebû. 2 Ji aliyê birayên li Lîstra
û Qonyayê ne ve, ji bo vî zilamî
qenc şahdeyî dihat kirin. 3 Pawlos
xwest ku wî jî bi xwe re bibe û ji
ber Cihûdên li wan aliya bûn, wî
ew girt û sunet kir; ji ber, hemûyan
dizanibûn ku bavê wî Grek e.
4 Û gava ji bajaran derbas dibûn,
biryarên ku şagirtên li Orşelîmê
ne û kalepîran dane, têdigîhandin
û dixwestin ku li gor vana bijîn.

1 Civakên bawerkiran.

5 Bi vî awayî Dêr di baweriyê de xwurt dibûn û hejmarên wan, roj bi roj zêde dibûn.

*Mesîh Şagirtên xwe bangî Makêdonyayê dike*

6 Piştî ku Ruhê Pîroz nehişt gotinê li Asyayê waz bidin, ew ji herêmên Frîgya û Galatyayê ve derbas bûn.
7 Dema hatin sînorê Mîsyayê xwestin ku derbasî Bitûnyayê bibin û Ruhê Îsa destûr neda wan.
8 Li ser vêya, ji Mîsyayê derbas bûn û hatin Troasê. 9 Wê şevê, Pawlos xewn û xeyalekî dît; li ber wî, zilamekî Makêdonî sekinîbû û li ber wî digeriya û digot: Derbasî Makêdonyayê bibe û alîkariyê ji me re bike! 10 Û gava wî vê xewn û xeyalê dît, em gîhaştin vê fikrê ku, Xwedê bona em Mizgîniyê belavî kesên wir bikin, bangî me dike, em hema bona çûyîna Makêdonyayê xebitîn.

*Bawerî anîna Lîdyayê*

11 Em ji Troasê ve ketin keştiyê û me raste rast berî da Samotraxê û dotira rojê çûn Neapolîsê 12 û ji wir derbasî Fîlîpiya navendekî Romayê ya bicîhbûnê û bajarê herî girîngî wê herêma Makêdonyayê ye, bûn û çend rojan em li vî bajarî man.
13 Roja Sebtê em ji deriyê bajêr derketin û çûn qeraxa çem; em difikirîn ku dê li wir cîhekî duê hebe û em rûniştin û me ji pîrekên li wir civiyane re got. 14 Ji bajarê Tiyatîrayê, bi navê Lîdya, pîrekek qumaşê erguwanî difiroşe û bi Xwedê ve diperiste, guh da me; bona ku bala xwe bide tiştên ji aliyê Pawlos ve dihatin gotin, Xudan dilê wê vekir. 15 Gava ew bi gelê mala xwe ve vaftîz bû, pîrekê lava kir û got: Ger hûn min bawerkirekî Xudan qebûl dikin, werin û li mala min bisekinin! Û zorê da me[1].

*Pawlos û Sîlas di Girtîgehê de*

16 Û wusa bû ku, dema em diçûn cîhê duayê, keçikek dîl ya di wê de ruhê remildariyê heye û xeberan ji hatinê ve dida û bi vî awayî gellek qezencê ji efendiyên xwe re dianî rastî me hat. 17 Keçik, li pey Pawlos û me ve ket, qêriya û got: Ev zilamana qûlê Xwedayê bilind in, rêya xelasiyê têdighînin we! 18 Û wê gellek rojan vêya kir. Lê belê Pawlosê zehf bêaram[2] bû, vegeriya û ji ruh re got: Ez bi navê Îsa Mesîh ve emir didim te, ji wê ve derkeve! Û hema di wê saetê de ruh derket.
19 Efendiyên keçikê dema dîtin ku hêviya qezenca wan tune bû[3],

---

[1] Wê em razî kirin.
[2] Aciz bû.
[3] Winda bû.

Pawlos û Sîlas girtin û kaşî qada
sûkê, ber bi rayedaran ve kirin 20 û
wan derxistin ber darazkiran û go-
tin: Ev zilamana Cihûd in û bajarê
me zehf tevli hev dikin 21 û hin
kevneşopên ku bona me Romayi-
yan qebûl kirin û çêkirinên wan ne
caiz in, belav dikin!

*Serokê Zîndanê tobe dike*

Fîl 1,12; 2.Tîm 2,3.10; 2.Kor 4,8-10

22 Û li dijî wan gel bi hev re serî
hildan û darazkiran emir dan ku
bila kincên wan bên çirandin û
bi dar ve bên lêxistin. 23 Û paşî
gellek lêxistinê li wan kirin, wan
avêtin girtîgehê û emir dan no-
bedar ku wan di bin ewledariyek
qenc de bigire. 24 Wî jî, gava ku
vî emrî stend, wan avêt aliyê gir-
tîgehê yê hundir û lingên wan li
qeydan xist[1].
25 Ber bi nîvê şevê Pawlos û Sîlas
dua dikirin û bi qesîdeyan Xwedê
bilindtir dikirin û girtiyan jî wan
guhdarî dikirin. 26 Nişka ve erd
hejînek[2] mezin çê bû, wusa ku, gir-
tîgeh ji bingehê ve lerizî û hema
hemû derî vebûn û zincîrên her kesî
vebûn. 27 Serokê zîndanê ji xewê
ve hişyar bû, dît ku hemû deriyên
girtîgehê vebûne; fikirî ku hemû
girtî reviyane û bona xwe bikuje,
destê xwe avêt şûrê xwe. 28 Lê belê
Pawlos bi dengekî bilind qêriya û
got: Tiştekî xerab bi xwe neke, ji
ber ku em hemû li vir in!
29 Wî ronahiyê xwest û ket
hundir, bi lerizandinê xwe avêt
ber Pawlos û Sîlas. 30 Û wan
derxistin derve û got: Efendîno,
bona ku ez xelas bibim, divê ez çi
bikim? 31 Wan jî gotin: Baweriyê
bi Xudan Îsa ve bîne, bi vî awayî
tuyê xelas bibî, tu û maliyên te[3]!
32 Û wan ji wî re û ji hemûyên
di mala wî de ne re gotina Xudan
gotin. 33 Û di wê saeta şevê de wî
wan girt cem xwe û birînên wan
şuşt û ew hema bi hemû maliyên
xwe re vaftîz bû. 34 Û ew birin
mala xwe û sifrekê li ber wan
danî û bi hemûyên maliyên xwe
yî baweriyê ji Xwedê re anîne bi
kêfxweşiyê ve coş dibû.

*Rayedar dev ji zordariyê berdidin*

2.Tîm 3,11

35 Dema bû roj, darazkiran wezî-
fedaran û bi wan re xebera: Wan
zilamana serbest berdin! şandin.
36 Û serokê zîndanê van gotin-
an ji Pawlos re got: Darazkiran
bona serbest berdana we emir
şand, niha hûn dikarin derkevin;
bi dilxweşiyê ve herin! 37 Lê belê
Pawlos ji wan re got: Li ber gel li
me, yên ku Romayî ne, xistin û me

1 Beştan xist, girê da.
2 Zelzeleyek.
3 An jî: Tu jî, maliyên te jî!

avêtin girtîgehê û ma niha me bi
dizîka davêjin derve? Ev nabe; bila
ew bi xwe werin û me derxînin!
38 Wezîfedaran van gotinan ji da-
razkiran re gotin û dema darazki-
ran bihîstin ku ew hemwelatiyên
Romayê ne, tirsiyan. 39 Hatin û
lava ji wan kirin û wan derxistin
derve û bona ji bajêr ve herin rica
ji wan kirin. 40 Gava ew ji girtî-
gehê ve derketin, çûn mala Lîdya-
yê û birayan dîtin, xemrevîniyê li
wan kirin û çûn.

*Li Selanîkê*

1.Sel 1; 2,1-16

17 Ji Amfîpolîs û Apol-
lonyayê derbas bûn û hatin
Selanîkê; li vir keniştek Cihûdan
hebû. 2 Pawlos li ser adeta xwe
çû cem wan û sê rojên Sebtê li ser
hev, li ser Nivîsên Pîroz bi wan re
axifî. 3 Di derheqê êş kişandin û
ji mirinê vejîniya Mesîh de da-
xuyaniyan dikir, delîlan nîşan
dida û digot: Ev Îsayê ku ez ji we
re didim bihîstin, Mesîh e! 4 Û
hinekên ji wan, ji Grekên peris-
tinê ji Xwedê re dikin, civakek
mezin û gellek pîrekê pêş ve tên
jî qanih bûn û beşdarî Pawlos û
Sîlas bûn.
5 Lê belê Cihûdên bêbawerî çav-
nebariyê li vêya kirin û hinek
mirovên bi bela yên teral digerin
bi pey wan xistin, ajaweyên me-
zin civandin û tevliheviyekê li
bajêr derxistin. Û bi armanca ku
wan bibînin û derxînin ber gel,
êrîşî mala Yason kirin. 6 Lê belê
dema wan nedîtin, Yason û hinek
birayan berbi rayedarên bajêr ve
kişandin û bi qêrîna: Ev mirovên
ku dinê tevlîhev kirine hatin vir
jî, diqêriyan; 7 Yason wan girt
mala xwe! Û ew hemû dibêjin qi-
ralekî din bi navê Îsa heye û bi vî
awayî, li dijî emrê Qeyser ve ra-
dibin! 8 Ajawe û rayedarên bajêr,
dema van gotinan bihîstin, ketin
teşqelê. 9 Û paşê ku wan ji Yason
û yên din, kefaletê stendin, wan
serbest berdan.

*Li Veriyayê*

10 Birayan jî hema wê şevê
Pawlos û Sîlas şandin Veriyayê;
dema ew gîhiştin wir, çûn kenişta
Cihûdan. 11 Lê belê vana ji yên li
Selanîkê hîn jî pêş ve difikirîn û
gotin bi balkêşî û têkiliyek mezin
guhdarî dikirin û her roj lêgerînê
li Nivîsên Pîroz dikirin û digotin
ka tiştên hîn dikin rast e, an çewt
e. 12 Bi vî awayî gellekên ji nava
wan û gellek pîrek û zilamên Grek
yên birêz bawerî anîn.
13 Lê belê dema hayê Cihûdên Se-
lanîkî ji bang kirina ku gotina Xwe-
dê ji aliyê Pawlos ve li Veriyayê jî
tête kirin, bû, ew hatin wir jî û gel
kişkişandin û şaş kirin. 14 Li ser
vêya, birayan hema Pawlos şandin
qeraxa behrê; lê belê Sîlas û Tî-

motêyos li wê derê man. 15 Yên ku
bi Pawlos re çûn, wî heta Atînayê
anîn û gava ku wan bona Sîlas û Tî-
motêyos demekî berî werin cem wî
emir girtin, ji wir vegeriyan.

*Pawlos li Atînayê*

16 Gava Pawlos, li Atînayê li
benda wan bû, dît ku bajar tije se-
nem in, di hundirê wî de ruhê wî
hêrs bû. 17 Bo vê sedemê, divê
him li keniştê bi Cihûdan re û bi
kesên dinî peristinê ji Xwedê re
dikin, him jî bi kesên her roj li
qada sûkê rastî wan dihat re diket
guftegoyê[1]. 18 Hinek feylesofên
ji Êpîkurî û Stoîkî jî bi wî re ke-
tin guftegoyê û hinekan: Eviyê
gotinpirr dixwaze çi bibêjî? Hin-
ekan jî: Zilamek îlahên biyanî
bang dike tête xuyanî kirin, go-
tin! Ji ber ku wî Îsa û qiyametê
ji wan re mizgînî dikir. 19 Û wan
wî girtin û ji Arîopag re birin û ji
wî re gotin: Gelo em dikarin hînî
ev hînkariya ku tu belav dikî bi-
bin? 20 Ji ber ku tu ji guhên me
re hinek tiştên xerîb tînî; ji ber vê
yekê em dixwazin ku hînî wateya
van tiştan bibin!
21 Hemû kesên Atînayî û kesên
xerîb, yên li wê derê rûdiniştin,
wextên xwe her tim bi axaftin û
guhdarî kirina tiştên nû ve derbas
dikirin.

*Pawlos di nava Arîopagê de wazê dide*

Rom 1,18-25; K.Şa 26,17-20;
Rom 1,16-17

22 Pawlos di nava Arîopagê de se-
kinî û got: Ya mêrên Atînayê, ez
dibînim ku hûn di her tiştî de zehf
oldar in! 23 Ji ber ku dema ez li
hawirdor digeriyam û lêkolînê li
cîhê ku hûn lê peristinê dikin diki-
rim, ez rastî pêşkêşgehekî li ser:
JI XWEDAYÊ NAYÊ ZANÎN RE
jî hatim. Niha yê ku hûn bêzanîn
peristinê ji wî re dikin, ez ji we re
didim nasîn.
24 Xwedayê ku dinê û hemû
tiştên di hundirê wê de afirandi-
ye, yê ku Xudanê erd û ezman e,
li perestgehên bi destan ve hati-
ne çê kirin rûnane. 25 Wekî ku
yê jiyan, hilm û her tiştî daye her
kesî ew e, mîna hewcedariya wî ji
tiştekî hebe, bi destê mirovan ji wî
re xizmet nayê kirin 26 û wî her
neteweyên mirovan ji xwînekê[2]
afirand û wan li çar hawirdorê
rûyê erdê bi cîh kir; demên hebû-
na wan û sînorên herêmên ku dê
ew li wir bi cîh bibin, ji berê ve
tespît kir; 27 da ku, bona li Xudan
bigerin û bi alîkariya destan ve be
jî wî bibînin; lê belê ew ji me yekî
jî ne dûr e; 28 ji ber ku em di wî
de dijîn, dileqin û henin; mîna ku,
ji hozanên we jî hinekan gotine:
Ji ber ku em jî ji nîjada wî ne.

1 Muneqeşeyê.

2 Ji mirovekî.

29 Niha, bona ku em ji nîjada Xwe-
dê ne, divê em nefikirin ku derûna
Xwedanî mîna tiştekî ji zêrî, an
zîvî, an jî ji kevirî ku bi huner û
ramanên mirovan ve hatine şikil
kirî be. 30 Niha, Xwedê, nezaniya
demên kevn ji nedîtiyê ve hat; lê
belê niha li her derê emir dide ku
bila her kes tobe bikin; 31 ji ber ku
Xwedê rojekê pêdand, di wê rojê
de, bi navgîniya zilamê ku wî wezî-
fedar kiriye, dê bi dadî daraziyê li
dinê bike; wî ji miriyan ve vejand
û bi vî awayî ewledariyê da hemû
mirovan.
32 Lê belê dema wan gotinên di
derheqê vejîna miriyan de bihîs-
tin, hinekan henekê xwe pê ki-
rin, lê belê hinekan jî gotin: Em
dixwazin di derheqê vê de dîsa
te guhdarî bikin! 33 Û li ser vêya
Pawlos ji nav wan derket û çû.
34 Lê belê hinek zilaman bawerî
anîn û beşdarî wî bûn; di nav vana
de Diyonîsyosê endamê Arîo-
pagê, pîrekek bi navê Damarîs û
çend kesên din jî hebûn.

*Pawlos li Korîntê*

18 Piştî vêya Pawlos ji Atînayê
derket û hat Korîntê. 2 Û li
wir, Cihûdek eslê wî Pontûsî, bi
navê Akvîla û pîreka wî Prîskîla,
yê ku hîn nû ji Îtalyayê hatiye, dît;
ji ber Klawdiyos, bona hemûyên
Cihûd Romayê biterikînin emir
dabû; Pawlos hate cem wan 3 û ji
ber ku wî bi xwe eynî karî dikir[1],
bi wan re ma û şuxulî; ji ber ku
karên wan çadirvanî bû. 4 Pawlos
her rojê Sebtê li kenîştê diket guf-
tegoyê û bona qanih kirina Cihû-
dan û Grekan dişuxulî.
5 Dema Sîlas û Tîmotêyos ji
Makêdonyayê ve hatin, Ruh zorê
dida Pawlos û ji Cihûdan re[2],
di derheqê Mesîh bûna Îsa de
şahdeyiyê dikir[3]. 6 Lê belê dema
ew li dijî wî rabûn û ji wî re dest
bi kufrê kirin, wî kincên xwe
dawişand û ji wan re got: Bila
xwîna we li ser serê we be! Ez
paqij im; ji niha pê ve, ez ê herim
neteweyan! 7 Û ew ji wir derket
û çû mala yekî peristinê bi Xwe-
dê ve dike, navê wî Tîtiyo Yûstûs
bû; mala wî li kêleka kenîştê bû.
8 Û Krîspoyê rêvebirê kenîştê,
tevî hemû maliyên xwe baweriyê
bi Xudan ve anî û gellek Korinti-
yên guhdarî kirin jî, bawerî anîn û
vaftîz bûn.
9 Şevê, Xudan di xewn û xeya-
lekê de ji Pawlos re got: Metirse,
lê biaxife û bêdeng nemîne! 10 Ji
ber ku ez bi te re me û tu kes ni-
kare destê xwe li te bixe, xerabiyê
bi te bike; ji ber ku li vî bajarî gelê

---

[1] Yanê ji yekmeslekî bûn.
[2] Kelamê di hundir de zor dida Pawlos, an jî: Pawlos xwe bi tûmî da belav kirina gotina Xwedê.
[3] Şahdeyiyê dida.

min pirr e! 11 Û ew di nav wan de
bi hînkirina gotina Xwedê salekî
û şeş meh rûnişt.
12 Dema Galiyo waliyê Ahayayê
bû, Cihûdan pev re, li dijî Pawlos
rabûn û wî birin ber kûrsiya dad-
gehê[1] û gotin: 13 Ev zilama miro-
van dixapîne, li dijî zagonê wan
ber bi peristina Xwedê ve dibe!
14 Lê belê gava Pawlos xwest ku
devê xwe veke, Galiyo ji Cihûdan
re got: Ya Cihûdno, ger doza we li
ser neheqî, an jî sûcek girîng ba,
hewce dikir ku bi sebir, min we
guhdarî bikira. 15 Lê belê ger li
gor pirsgirêk di derheqê gotinekê,
navan û zagona we de be, hûn li
vê dozê binihêrin; ji ber, ez na-
xwazim ku bibim darazkirê van
tiştan! 16 Û wî wan ji kûrsiya dad-
gehê ve qewirand. 17 Û hemûyan
pev re, rêvebirê kenîştê Sostenîsê
Grekî pê girtin û li ber dadgehê li
wî xistin û Galiyo guh neda tiştên
dibe û diqede.

*Vegera Antaqyayê*

18 Piştî ku Pawlos, hîn gellek ro-
jan li wê derê ma; xatir ji birayan
xwest û bi Prîskîla û Akvîla, bona
herin Sûriyê, bi keştiyê ve ketin
rê; ji ber ku nezir danîbû, porên
xwe li Kenherê jêkiribû. 19 Û
ew gîhaştin Efesê, wî wan li wir
hişt; lê belê ew bi xwe çû kenîştê
û bi Cihûdan re kete guftegoyê.
20 Gava wan ji wî xwestin ku de-
mekî hîn jî dirêj li cem wan bimî-
ne, wî qebûl nekir; 21 lê xatir ji
wan xwest û got: Ger Xwedê bi-
xwaze ez ê dîsa vegerim cem we!
Û ew ji Efesê ve vebû behrê.
22 Gava ew gîhaşt Sezariyê, çû
Orşelîmê û serîkî da Dêrê û paşê
ji wir jî derbasî Antaqyayê bû.
23 Û demekê li wir ma pê ve der-
ket rê û bi dorê li herêmên Galat-
ya û Frîgyayê geriya û quwet da
hemû şagirtan.

*Gera sêwemîn ya Mizgîniyê*

*Apollos li Efesê*

1.Kor 3,4-8

24 Cihûdek li Îskenderiyê bûyiye,
bi navê Apollos hate Efesê; hune-
ra axaftinê gellekî bi wî re hebû, di
Nivîsên Pîroz de bihêz bû. 25 Ev
zilam di rêya Xudan de hatibû per-
werde kirin û bi ruhekî agirmend
diaxifî û tenê bi zanebûna xwe yî
vaftîza Yehya, rastiyên di derheqê
Îsa de bi avayekî rastî dida hînki-
rinê. 26 Û li kenîştê, bi metirsiyê
dest bi axaftinê ve kir. Gava ku
Prîskîla û Akvîla wî guhdarî kirin,
wî girtin cem xwe û rêya Xwedê
hîn jî bi rastî têgîhandin wî.
27 Û dema wî xwest ku here Aha-
yayê, birayan wî bi metirsî kirin û
bona ku wî qebûl bikin, ji şagirtan
re nivîsandin. Û dema ew gîhaşt
wê derê, zehf alîkariyê ji kesên

1 Mehkemê.

bi xêra Xwedê ve bawer kirine re
kir. 28 Ji ber ku ji Nivîsên Pîroz,
bi hêza mezin ve Mesîhtiya Îsa
bi eşkeretî îspat dikir û îddiayên
Cihûdan dirizand[1].

*Pawlos li Efesê*

1.Kor 16,8-9

19 Û wusa bû ku, dema Apol-
los li Korîntê bû, Pawlos ji
herêmên jorîn ve derbas bû û hat
Efesê. Û gava ku wî çend şagirt
dît, 2 wî ji wan re got: Dema we
bawerî anîn, ma we Ruhê Pîroz gir-
tin? Lê belê wan ji wî re gotin: Me,
hebûna Ruhê Pîroz jî nebihîstine!
3 Û wî ji wan re got: Wê çaxê hûn
li ser çi vaftîz bûn? Wan gotin: Li
ser vaftîza Yehya. 4 Pawlos got:
Yehya ji netewê re bi gotina, ji yê
ku li pêy xwe tê ve, yanê, bi Îsa
bawerî anînê ve digot û bi vaftîza
tobê ve vaftîzê kir. 5 Wan jî dema
vêya bihîstin, bi navê Xudan Îsa ve
vaftîz bûn. 6 Û dema Pawlos destê
xwe danî ser wan, Ruhê Pîroz hate
ser wan û bi zimanan ve diaxifîn
û peyxambertiyê dikirin. 7 Hemû
hema hema donzdeh zilam bûn.

*Sê salên li Efesê*

Îbr 2,3-4; Rom 15,16-19; 2.Kor 12,12

8 Û ew kete keniştê û bi cesaretê
dest bi axaftinê kir, di nava sê
mehî de, bi kesên li wir in re ket
guftegoyê û sekinî, wan bona bi
Serweriya Xwedê ve qanih bike
şuxulî. 9 Lê belê gava hinekan bi
awayekî dijwar, bona bawer nebin
inyadê kirin û Rê li ber çavê ci-
vatê bi xerabî dan nasîn[2]; Pawlos
ji wan veqetiya û şagirt cuda kir
û li dersxana Tîrano her roj gufte-
goyên xwe domand. 10 Vêya du
salî dom kir; ûsa ku, him Cihûd,
him jî Grek, hemû kesên li Asyayê
dijîn, gotina Xudan bihîstin.
11 Û Xwedê, bi destê Pawlos ve
mûcîzetên derasayî[3] pêk dianî;
12 ûsa ku, destmal an jî pêştmalên
li bedena wî ketine, dema ji
nexweşan re dibirin û nexweşiyan
ji wan diçûn û ruhên xerab ji hun-
dirê wan ve derdiketin.
13 Lê belê hinek Cihûdên li dora
herêmê digeriyan jî bi qewirandi-
na ruhê xerab ve mijûl dibûn, dest
bi yên bindestê ruhên xerab in, bi
bîranîna navê Xudan Îsa ve xelas
bikin kirin; bi navê Îsayê ku Paw-
los dide nasîn em ji we re emir di-
kin! digotin. 14 Û ji yên ku vêya
dikirin, heft lawên Skevayê ku Se-
rokkahînekî Cihûdî ye hebûn.
15 Lê belê ruhê xerab bersivê da
û ji wan re got: Ez Îsa nas dikim,
Pawlos jî dizanim, lê belê hûn kî
ne? 16 Û zilamê ku ruhê xerab di

[1] Xera dikir.
[2] Dest bi xerabiya rêya (Îsa) kirin.
[3] Yên bihêz.

wî de ye, êrîşî wan kir, ji wan dudo
mexlûb kir; ûsa ku, ew bi tazîtî û
birîndarî ji wê malê reviyan.
17 Û hemûyên ku li Efesê
rûdiniştin, vêya bihîstin; him
Cihûdan him jî Grekan û tirs kete
ser hemûyan û navê Xudan Îsa,
hate bilind kirin[1]. 18 Gellekên
bawerî anîne jî dihatin, xerabiyên
ku kirine eşkere dikirin û digo-
tin. 19 Gellek kesê bi sêhrê mijûl
bûne jî pirtûkên xwe civandin û li
ber her kesî şewitandin û berdê-
la wan hesibandin, dîtin ku pêncî
hezar zîv dikir. 20 Bi vî awayî
gotina Xudan bi qudretê belav
dibû û xurt dibû.
21 Gava ev tiştana qediyan, Paw-
los di ruh de nêt kir ku, ji Makê-
donyayê û Ahayayê derbas bibe,
biçe Orşelîmê û got: Paşî ez herim
wir, hewce dike ku ez Romayê jî
bibînim! 22 Du alîkirê xwe, Tî-
motêyos û Êrastûs şand Makê-
donyayê û ew bi xwe demekî din
jî li Asyayê ma.
23 Lê belê di wê demê de, tevli-
heviya ku di derheqê Rê de der-
ket, ne hindik bû. 24 Ji ber ku zêr-
karê bi navê Dîmîtriyos, bûkên[2]
perestgeha Artêmîs yên zîvî çê
dikir û bi vî awayî ji hunermendê
karên destan re gellekî kar derdi-
xist. 25 Û wî hunermendan û yên
ku bi karên mîna vêya mijûl dibin
civand û ji wan re got: Efendîno,
hûn dizanin ku dewlemendiya me
ji vî karî ye. 26 Û hûn dibînin û
dibihîzin ku, ev Pawlos bi gotina,
yên ku bi destan ve têne çêkirin
ne îlah in, ne tenê li Efesê, lê belê
hema li hemûya Asyayê pirr kesî
xapand û ji rê ve çewt kir. 27 Û
xeter, tenê ne ji giramiyê ketina
vê hunera me ye; lê belê bi tune
hesibandina perestgeha îlahe
ya mezin Artemîs, bi nizm kiri-
na mezinahiya îlahe ya hemûya
Asya û dinê pê diperistin e.
28 Û dema ku wan vêya bihîstin, bi
hêrs ve tijî bûn û bi qêrîna: Artemî-
sa Efesiyan mezin e[3]! qêriyan. 29 Û
bajar bi tevliheviyê ve tijî bû û hemû
pevra rêhevalên Pawlos, Gayûsê
Makêdonî û Arîstarko girtin, bi
erdê ve kaş kirin û êrîşî şanogehê[4]
kirin. 30 Gava ku Pawlos xwest tê-
keve nav gel, şagirtan wî nehiştin.
31 Hinek rêvebirên Asyayê jî, yên
ku hevalê wî bûn, ji wî re xeber
şandin û bona li şanogehê nêdîtin,
li ber wî geriyan.
32 Ji ber ku civak di nava tevliheviyê
de bû; her yekî, tiştekî din diqêriyan
û gellekan nizanîbûn ku ka ew bona
çi civiyane. 33 Û Cihûdan Îskender
pêş ve ajotin û ji ajawê derxistin. Û
Îskender bi destê xwe ve nîşanê da,

1 Pesnahî dan navê Xudan Îsa.
2 Maketên perestgeha Artêmîs.
3 Bilind e!
4 Tiyatroyê.

xwest ku li ber gel parastina xwe
bike. 34 Lê belê dema wan fêhm
kirin ku ew Cihûd e, nêzîkî du saetî
hemû, bi devekî qêrîna: Artemîsa
Efesiyan mezin e! qêriyan.
35 Û gava nivîskarê bajêr gel aş
kir, got: Ya mêrên Efesê, gelo ji
mirovan kî heye ku, nizane ba-
jarê Efesê, parêzgerê perestgeha
Artemîsa[1] mezin û pûta[2] ku ji ez-
man ve ketiye yî? 36 Niha li dijî
vana tiştek nayê gotin û bona
vêya hewce dike ku hûn aram bin
û tiştekî çewt çê nekin. 37 Ji ber,
ev zilamên ku we anîne vir, ne pe-
restgehan talan kirin ne jî kufrê ji
xwedana me re kirin. 38 Ger giliyê
Dîmîtriyûs, an jî hevalekî wî yî hu-
nermend hebe, dadgeh vekirîne û
darazkir jî hene; bila sûcdariya hev
û din li wir bikin! 39 Ger rewşekî
dinî hûn lêgerînê li wê bikin hebe,
divê ew di civakekî zagonî de bê
axaftin. 40 Ji ber bûyerên ku îro
çêbûne, em di xetera darazbûnê
de ne, ji ber serî hildanê; li gor tu
sedema vê tevliheviyê nîne, em ni-
karin hisabê wê jî bidin! 41 Û paşî
ku wî vana got, gel belav kir.

*Pawlos li Makêdonyayê û Grekîstanê*

1.Kor 16,1-7; 2.Kor 7,5; Rom 15,25-27

20 Û piştî ku tevlihevî aş bû,
Pawlos bangî şagirtan kir
û wan teşwîq kir û xatir ji wan
xwest û bona ku here Makê-
donyayê derket rê. 2 Piştî ku ew
li wan herêman geriya û bi gel-
lek gotinan wan teşwîq kir, hate
Grekîstanê. 3 Û wî sê mehe li wir
derbas kir û gawa wî xwest ku bi
rêya behrê ve biçe Sûriyê, ji ber
ku Cihûdan dek û dolavek li dijî
wî ava kiribûn, biryar da ku vege-
ra xwe li ser rêya Makêdonyayê
ve bike. 4 Û lawê Pîros Soparêyê
Veriyayî, ji Selanîkiyan Arîstar-
kûs û Sêkûndûs, Gayoyê Derbêyî
û Tîmotêyos û ji Asyayê Tîhîkûs
û Trofîmos heta Asyayê bi wî re
çûn. 5 Vana ji pêşiyê ve çûn û li
Troasê li benda me man. 6 Em jî
di paşî rojên Nanê Bêhavên[3] de, ji
Fîlîpê ve vebûn behrê û di pênc
rojî de gîhaştin Troasê û hatin
cem wan; em heft roj li wir man.
7 Dema di roja heftê ya yekemîn
de, bona nan par[4] bikin em hatin
cem hev, Pawlos bi wan re axifî
û ji ber wî nêt kir ku dotira rojê
derkeve rê, gotina xwe heta nîvê
şevê domand.
8 Li oda qatê jorîn ya ku em li
wê civiyabûn, gellek qendîl he-
bûn. 9 Ciwanek bi navê Eftîko di
şivakê de rûnişt, bi xewekî giran
ve ket û her ku Pawlos axaftina
xwe dirêj kir, di xewa xwe de têk

[1] Dîana.
[2] Kevir, sûret.
[3] Fisih.
[4] Parî, perçe.

çû û ji qatê sisiyan ve ket xwarê
û bi mirîtî hate rakirin. 10 Paw-
los daket jêr, xwe avêt ser û wî
himbêz kir û got: Galegalê me-
kin, ji ber ku canê wî di wî de ye!
11 Dîsa derket jor, nan parî kir û
xwar, heta ku roj derket bi wan
re, bi dirêjî axifî û ûsa derket rê.
12 Lê wan lawik bi zindî anîn û
gellekî xemrevînî dîtin.

*Gera Asosê*

13 Em ji pêşiyê li keştiyê siwar
bûn û bi nêta rahiştina Pawlos, ber
bi Asosê ve derketin rê; ji ber ku
ew bi xwe di nêta bi peyatî çûyînê
ve ûsa xwestibû. 14 Dema li Asosê
ji me re pêşwazitiyê kir, me wî girt
keştiyê û em derbasî Mîdîliyê bûn.
15 Û ji wir em vebûn behrê û dotira
rojê em gîhaştin ber girava Kîosê
û dotira rojê me serîkî da Samosê
û roja din em gîhaştin Mîletê. 16 Ji
ber ku Pawlos, bona ku li Asyayê
wext winda neke, biryar dabû ku
bêsekin ji ber Efesê ve derbas
bibe; ji ber ku ger mimkûn bibûya
bona ku di roja Pentîkostê de li
Orşelîmê be lez dikir.

*Pawlos ji Kalepîrên Efesî ve xatir dixwaze*

1.Sel 2,1-12; 1.Pêt 5,1-4;
Met 7,15-20; 2.Pêt,1-3

17 Wî, ji Mîletê şand Efesê û ka-
lepîrên Dêrê bangî cem xwe kir.
18 Û dema hatin cem wî, ji wan
re got: Hûn bi xwe dizanin, ji roja
yekemîn ve ku min gava xwe avêti-
ye Asyayê, hemûya wextê li cem
we têkiliyên xwe çawa danîme;
19 bi dilnizmiyek bitûmî û di nava
hêstirê çavan de, ji ber ceribandinên
ku bi dek û dolavên Cihûdan ve ha-
tiye serê min, xizmetê ji Xudan re
kirim 20 û ji tu tiştên ku ji we re
bi fêde ye, bona ku bidim bihîstin,
xwe nedam alî 21 û bona, ji Xwedê
re tobê û ji Xudanê me Îsa Mesîh
re bawer kirinê, min him ji Grekan,
him jî ji Cihûdan re şahdeyiyê kir û
him bi eşkereyî, him jî xanî bi xanî
gerê ve hînî we kir.
22 Û niha, a vay, ez di Ruh de
bi girêdayî diçim Orşelîmê; li
wê derê dê çi bê serê min, ez ni-
zanim; 23 lê Ruhê Pîroz, li her
bajarî ji min re şahdeyiyê dike û
dibêje ku, tengasî û zincîr û qeyd
li benda min in! 24 Lê belê ez ji
bona xwe qet qîmetê nadim canê
xwe; bes ku, bona ez dewra xwe û
şahdeyiya Mizgîniya xêra Xwedê
bikim, di xizmeta ku min ji Xudan
Îsa ve stendiye de bi kefxweşiyê
ve serfiraz bibim.
25 Û niha, a vay, ez dizanim ku,
hûn, yên ez di nav wan de geriyam
û Serweriya Xwedê têgîhandime
wan, êdî wecê min nebînin. 26 Ji
bo vê yekê, ez di roja îro de ji we
re şahdeyî dikim ku, ez ji xwîna
hemûyan paqij im. 27 Ji ber ku
min xwe ji bo xwestina Xwedê ya

bê kêmasî bighînim we neda alî.
28 Ji xwe re û bona ajotina Dêra
ku Xudan bi xwîna xwe ve bi
dest ve xistiye, li hemûya keriyê
ku Ruhê Pîroz we ji wê re bi çav-
nêrîtiyê wezîfedar kiriye miqate
bibin! 29 Ji ber ku ez dizanim,
piştî ku ez herim, gurên hov yên
keriyê neparêzin dê têkevin nav
we 30 û bona ku şagirtan li pey
xwe bibin, dê ji nava we jî kesên
gotinên rêşaş bibêjin derkevin.
31 Ji ber vê yekê hişyar bin, bi bîr
ve bînin ku min di nava sê salî de
bêsekin, şev û roj, bi hêsirên ça-
van ve çawa yek û yek îkaz dikir.
32 Û ez niha we emanetî Xwedê û
gotina xêra wî dikim; ew di hêza
ku we pêş ve bibe û di nava hemû
pîrozan de mêrasê bide we de ye.
33 Min qet çav bernedaye zîv, an jî
zêr, an jî kincên tu kesî. 34 Hûn bi
xwe dizanin ku, ji hewcedariyên
min re û ji yên bi min re ne re, van
destan xizmetê kirin. 35 Di her tiştî
de nîşanî we dam ku, bi vî awayî
ked kişandin û alîkarî kirina lawa-
zan û bîranîna gotina Xudan Îsa bi
xwe gotiye: Dayîn ji stendinê hîn
jî dilşadtir e! hewce dike.
36 Û piştî ku wî van tiştan got,
çong danî û bi hemûyan re dua kir.
37 Hemû zehf giriyan û xwe avêtin
histuyê Pawlos û wî ramûsandin[1];
38 yê wan herî xemgîn kir, gotina
wî ya, hûn ê êdî wecê min nebînin
bû. Û wan heta keştiyê wî derbas
kirin.

*Rêwîtiya Orşelîmê*

21 Û wusa bû ku, gava em
ji wan veqetiyan û vebûn
behrê, em raste rast çûn Qosê;
dotira rojê derbasî Rodosê, ji
wir jî hatin Patarayê. 2 Û gava
me keştiyek ku diçe Fînîkyayê
dît, em li wê siwar bûn û vebûn
(behrê). 3 Dema Qibris hate dîtin,
me wê li çepê hişt, çûn Sûriyê û
em li Sûrê hatin xwarê; ji ber ku
dê keştî, barên xwe li wir vala
bikira. 4 Û gava me şagirtan
dîtin, em heft roj li wê derê man;
vana bi navgîniya Ruh, bona neçe
Orşelîmê ji Pavlos re digotin. 5 Û
wusa bû ku, dema roja me tijî bû,
em derketin çûn û hemûyên ba-
werkiran, tevî jin û zaroyên xwe,
heta derveyî bajêr bi me re hatin
û me derbas kirin û me li qeraxa
behrê çong danîn û dest bi duayê
kirin. 6 Û piştî ku me xatir ji hev
û din xwest, em li keştiyê siwar
bûn, ew jî vegeriyan malên xwe.
7 Û ji Sûrê ve me rêvîtiya xwe
yî behrê qedand û em hatin Pto-
lemaîsê û me silav da birayan û
rojekê li cem wan man. 8 Dotira
rojê em derketin û hatin Sezariyê
û em çûn mala Fîlîpûsê belavkirê
Mizgîniyê, yê ji Heftan yek bû û
li cem wî man. 9 Çar keçikê wî zi-

[1] Maç kirin.

lamî, yên ku peyxambertî dikirin û nezewicîne hebûn.
10 Gava em gellek rojan li wê derê man, ji Cihûstanê peyxamberek bi navê Agabûs hat jêr[1].
11 Ew hate cem me û şûtika[2] Pawlos rahişt, dest û lingên xwe girê da û got: Ruhê Pîroz ûsa dibêje: Dê Cihûd, xwediyê vê şûtikê, li Orşelîmê bi vî awayî girê bidin û bidin destê neteweyan!
12 Dema me van gotinan bihîstin, him em û him jî yên ji wir in, bona neçe Orşelîmê, li ber wî geriyan.
13 Lê belê Pawlos bersivê da: Hûn çi dikin, çima hûn digirîn û dilê min diêşînin? Ji ber ku ez di oxra navê Xudan Îsa de li Orşelîmê, ne tenê ji girêdanê re, lê belê ji mirinê re jî amade me!
14 Û dema ew qanih nebû, me got: Bila xwesteka Xudan bibe û em bêdeng man!
15 Paşê wan rojan, me amadekariya xwe ava kir û ber bi Orşelîmê derketin rê.
16 Û hinek şagirtên Sezariyê jî bi me re hatin. Me ji yê ku em ê li cem wî mêvan bibin re, ji Mînasonê Qibrisî yê şagirtekî kevn e re birin.

*Pawlos li Orşelîmê*

1.Kor 9,19-23

17 Dema em gîhaştin Orşelîmê, birayan bi kêfxweşî pêşwazîtiya me kirin.
18 Dotira rojê, Pawlos bi me re ket cem Aqûp û kalepîran hemû hatin wir.
19 Piştî ku wî silavê da wan, tiştên ku Xwedê di nava neteweyan de bi navgîniya xizmeta wî kiriye, yek û yek got.
20 Lê belê dema wan vana bihîstin, Xwedê bilindtir kirin û ji wî re gotin: Tu dibînî bira, di nava Cihûdan de bi hezaran bawerkir hene û hemû bona zagonê bi xîret in.
21 Lê belê ji bona te agahî stendine ku, tu ji hemû Cihûdên di nava neteweyan de dijîn re dibêjî, zarokên xwe sunet mekin, li pey kevneşopan neçin û tu li pey neçûna Mûsa hînî wan dikî.
22 Niha dê çi bibe? Divê di her awahiyê de gellek bên ba hev; ji ber ku dê muheqeq hatina te bibihîzin.
23 Bo vê yekê tiştên ku em ji te re dibêjin çêke: Di nava me de çar mirovên boraq danîne hene;
24 vana bigire cem xwe û tevî wan xwe paqij bike û bona ku serê xwe kur bikin mesrefê li wan bike; bi vî awayî dê her kes fêhm bike ku, tiştên di derheqê te de bihîstine bêbinî ne û tu jî li gor zagonê ve dijî.
25 Lê belê me, bona neteweyên ku bawer kirine, bona ku xwe, ji tiştên ku ji pûtan re hatine qurban kirin û ji xwînê û ji yê hatiye xeniqandinê û ji zînayê ve biparêzin, nivîsandin.
26 Wê demê Pawlos wan zilaman

1 An jî: Hat xwarê.

2 Piştika Pawlos.

girt cem xwe û roja din, tevî wan
xwe paqij kir û heta ku bona wan
her yekî qurban bête pêşkêşî ki-
rin qedandina rojên wanî teharetê
bang kir û ket Perestgehê.

*Pawlos tê girtin*

K.Şa 20,23; 1.Sel 2,15-16

27 Û dema heft roj dikira biqe-
diya, Cihûdên ji Asyayê ne, wî
li Perestgehê dîtin, hemû ajawê
kişkişandin û dest avêtin wî 28 û
bi qêrîna: Ya mêrên Îsraêlê, alîka-
riyê bikin! qêriyan. Yê li her derê
hînkariyên li dijî gel, zagonê û vê
derê belavî her kesî dike, ev zila-
ma ye! Û xeynî vêya wî Grekan jî
xist Perestgehê û vî cîhê pîroz ge-
marî kir! 29 Ji ber ku wan, ji berê
ve Trofîmosê Efesî, di bajêr de bi
wî re dîtibûn û wusa zen dikirin
ku Pawlos wî xistiye Perestgehê.
30 Hemûya bajêr rabûbû ser pêlan
û gelê ji her alî ve bi bazdan ha-
tin, Pawlos girtin û ji Perestgehê
ve kişandin derve û hema deriyên
Perestgehê hate girtin. 31 Gava
ew bona Pawlos bikujin dixebitîn,
nûçeya ku hemû Orşelîm tevlihev
bûye gîhaşt fermandarê tabûrê[1].
32 Wî jî hema serpel û leşkeran
girt cem xwe û ber bi wan ve
baz da. Gava ku wan fermandar
û leşkeran dîtin, dev ji lêxistina
Pawlos berdan.
33 Wê gavê fermandar nêzîk hat
û bi wî girt û bona ku bi cotek
zincîr ve bête girêdan emir da û
ka ew kî ye û wî çi kiriye, pirsi-
yariyê kir. 34 Ji ber ji ajaweyê hin
kes wusa, hin kes jî bi awayekî
din bang dikir û wî ji ber galegalê
ya rast fêhm nekir û birina wî yî
kelehê emir kir. 35 Dema ew hate
cem pêlikan, ajawe ewqas har
bûbû ku, leşkeran mecbûr man ku
wî hilgirin. 36 Ji ber ku ajawe bi
qêrîna: Wî bikujin! diqêriyan û li
pey wan diçûn.
37 Berî ku têkeve kelehê, Pawlos
ji fermandar re got: Gelo ez
dikarim tiştekî ji te re bibêjim?
Wî jî got: Tu bi Grekî dizanî?
38 Ma tu ne Misiriyê demekî
berî vêya serîhildanek danî û çar
hezar dijrabirî bir çolê yî? 39 Lê
belê Pawlos got: Ez ji Kîlîkyayê,
Cihûdek Tarsûsî, hemwelatê
welatekî qet jî ne bêgirînge me.
Ez ji te rica dikim, bona ku ez ji
gel re biaxifim destûrê bide min!
40 Û gava wî destûr da, Pawlos
li ser pêlika rabû û bi destê xwe
nîşanek ji gel re çêkir û dema
bêdengiyek kûr çêbû, wî bi zimanê
Îbranî dest bi axaftinê kir:

*Pawlos ji gelê xwe re*
*Mizgîniya Îsa Mesîh dibêje*

K.Şa 9,1-30; 26,9-21; 1.Tîm 1,12-13

22 Birano û bavikno, niha
xweparastina ku ez ê ji

---

[1] Tabûra Romayê.

we re bikim, guhdarî bikin! 2 Û
dema wan bihîstin ku ew bi zi-
manê Îbranî ji wan re diaxife, hîn
jî bi zêdeyî bêdeng man û wî got:
3 Ez Cihûdekî li Kîlîkyaya Tar-
sûsê ve hatiye dinê me, lê belê,
di bin lingên Gamalyel de, li vî
bajarî hatim mezin kirin û mîna
ku hûn îroj hemû ûsa ne, ez, bona
Xwedê wekî bi xîret bim, li gor
dijwariya zagona bapîran hatim
perwerde kirin. 4 Min ji vê Rêya
re heta kuştinê zulmê dikir, mêran
û pîrekan bêcihêtî wan girêdidan
û wan davêtin girtîgehê; 5 çawa
ku, Serokkahîn û hemû sazûmana
kalepîran ji min re şahdeyiyê di-
kin. Ji wan, ji birayan re nameyan
stendim û bona yên li Şamê ne,
bên ceza kirinê bi girêdayî bînim
Orşelîmê, diçûm wir.
6 Û wusa bû ku, gava ez ber bi
nîvrojê di rê de diçûm û nêzîkî
Şamê dibûm, nişka ve ronahiyek
mezin ji ezman ve dora min ronî
kir. 7 Ez ketim erdê û min bihîst
ku dengek ji min re dibêje: Saûl!
Saûl! Çima tu zulmê li min dikî?
8 Lê min pirsa: Ya Xudan, tu kî
yî? pirsî.
Û wî ji min re got: Ez Îsayê Nisrêtî
me; yê ku tu zulmê li wî dikî!
9 Yên bi min re her çiqas ronahiyê
dîtin û bi tirsê ve tijî bûn jî, lê
belê gotinên yê bi min re diaxife
nebihîstin. 10 Û min got: Ya
Xudan, divê ez çi bikim? Xudan
ji min re got: Rabe û here Şamê!
Hemû tiştên ku tu bi kirinên wan
hatiye wezîfedar kirin, dê li wir ji te
re bê gotin. 11 Û dema ji rewnaqiya
wê ronahiya ku dibiriqe nikarîbûm
ku bibînim, yên li cem min bûn, bi
destên min girtin û min birin Şamê.
12 Zilamek bi navê Hananya yê
li gor zagonê oldar, yê ku ji aliyê
hemû Cihûdên ku li wir rûdinin
ve bi qencî tête şahdeyî kirin hate
cem min, 13 sekinî û ji min re got:
Birayê Saûl, bila çavên te dîsa
bibînin! Min jî di wê demê de wî
dît. 14 Lê belê wî got: Xwedayê
bapîrên me, bona tu xwestina wî
bizanibî û yê bi Dad e bibînî û
dengekî ji devê wî ve bibihîzî te
bijartiye. 15 Ji ber, bona tiştên ku
te dîtine û bihîstine, tuyê ji hemû
mirovan re bibî şahdeyê wî. 16 Û
niha, ma tu çi dereng dimînî? Rabe,
vaftîz bibe, bangî navê Xudan bike
û ji gunehên xwe were şûştin!

*Pawlos ji Neteweyan re tête şandin*

17 Û wusa bû ku, gava ez
vegeriyam Orşelîmê, dema min di
Perestgehê de dua dikir, ez ji xwe
derbas bûm 18 û wî dîtim û ji min
re got: Lez bike û zû ji Orşelîmê
derkeve; ji ber ku dê şahdeyiya te,
ya di derheqê min de qebûl nekin!
19 Û min got: Ya Xudan, ew bi
xwe jî dizanin ku, min yên ba-
werî bi te dianîn davêtin hepsê û
di kenîştan de didam lêxistin 20 û

dema xwîna şahidê te Steyfan hate
rijandin, ez jî li wir sekinîbûm û
ez bi vî karî razî bûm û li benda
kincên yên ku wî kuştine mam.
21 Xudan jî ji min re got: Here,
ji ber ku ez ê te ji dûra re, ji nete-
weyan re bişînim!
22 Wan heta vê gotinê li wî guhdarî
kirin û dengê xwe bilind kirin û go-
tin: Zilamê ûsa ji rûyê erdê rake, ji
ber ku jiyana wî ne li cîh e!
23 Dema ew bi vî awayî diqêri-
yan û bi kilkirina kincên xwe
tozê bi hewayê ve diweşandin,
24 fermandar emir da ku wî bi-
bin hundirê kelehê; bona fêhm
bike ku ka ew bona çi ûsa li dijî
wî diqêrîn, emir da ku bi qamçî
kirinê wî bikişînin pirsiyariyê.
25 Lê belê gava wî bi şîpan ve
girê didan, Pawlos ji serpelê li
cem xwe disekine re got: Ma ji we
re caiz e ku; hûn zilamekî Romî û
hîn nehatiye daraz kirin, bidin ber
qamçiyan? 26 Dema serpel vêya
bihîst, çû xeber da fermandar û
got: Tu çi dikî? Ji ber ku ev zila-
ma, niştewarê Romayê ye!
27 Û fermandar hat û ji wî re got:
Ka ji min re bibêje, gelo tu Ro-
mayî ye? Wî jî got: Erê! 28 Fer-
mandar got: Min bi dana perekî
pirr vê niştewariyê bi dest ve xist.
Pawlos jî got: Lê belê ez ji bûyînê
ve niştewarê Romayê me! 29 Wê
wextê yên ku wî bikişînin pirsi-
yariyê, hema ji cem wî vekişiyan
û fermandarê ku wî daye girêdanê
jî, dema bihîst ku ew niştewarê
Romayê ye, tirsiya.
30 Û hela ka, çima ji aliyê Cihû-
dan ve tête sûcdar kirin, bi xwesti-
na ku hînî rastiya vêya bibe, doti-
ra rojê wî vekir, ji serokkahînan
re û ji hemûya Civata Netewî re,
bona ku bicivin emir kir û Pawlos
daxist jêr û derxist ber wan.

*Pawlos li ber Civata Netewî*

23 Pawlosê ziq çavên xwe
berda Civata Netewî û got:
Ya birano, ez heta îroj, bi ûcdanek
bitûmî qenc ve li ber Xwedê diji-
yam. 2 Û Serokkahîn Hananya,
emir da ku yên li cem wî disekinin,
bila li devê wî bixin. 3 Wê gavê
Pawlos ji wî re got: Ya dîwarê bi
sîwax, dê Xwedê li te bixe! Ma tu
him min, bona li gor zagonê daraz
bikî rûniştiye û him jî, li dijî zagonê
emir dide ku bila li min bixin?
4 Û yên li cemê disekiniyan go-
tin: Ma tu heqaretê li Serokkahînê
Xwedê dikî?
5 Pawlos jî got: Birano, min ni-
zanîbû ku Serokkahîn e. Ji ber ku
hatiye nivîsandin: Tu ji bona se-
rokê gelê xwe bi xerabî nebêje[1].
6 Û Pawlosê fêhm kir ku, hinekên
li wir in, ji mezheba Sadûqiyan û
hinekan jî ji mezheba Fêrisiyan e,
di Civata Netewî de qêriya: Bira-

[1] An jî: Naletê meke. (2.Mûsa 22:28)

no, ez Fêrisî û kurê Fêrisî me; ez ji
ber hêviya ku dê mirî bivejin, tême
daraz kirin! 7 Gava ku wî vêya
got, di navbera Fêrisî û Sadûqiyan
de keftûleftiyek bû û Sazûman bû
du parî. 8 Ji ber ku Sadûqî dibêjin,
ji mirinê ve vejîn, milyaket û ruh
tunene; lê belê Fêrisî ji her duyan
re jî mukur tên.
9 Tevliheviyek mezin bû û hinek
alimên zagonê yên ji mezheba
Fêrisiyan rabûn û bi keftûleftê
ve gotin: Em di vî zilamî de qet
xerabiyekê nabînin û ger ruhek
an jî milyaketekî jê re gotibe, dê
çi dibe? 10 Û gava keftûleftek
mezin bû, fermandar, ji ber ku dê
Pawlos bikujin zehf tirsiya; emir
da leşkeran ku dakevin jêr, wî bi-
zorê ji nav wan bikişînin û bibin
kelehê.
11 Dotira şevê Xudan li cem wî se-
kinî û got: Dilawêr[1] be, Pawlos! Ji
ber ku divê te çawa li Orşelîmê di
derheqê min de şahdeyiyê kir, hew-
ce dike ku tu li Romayê jî ûsa bikî.

*Cihûd ji bo kuştina Pawlos sondê dixwin*

12 Gava ku bû roj, Cihûdan di
nav xwe de, peymanekê bi dizî
çêkirin û bi gotina: Heta ku em
Pawlos nekujin, ger em tiştekî
bixwin û vexwin, bila nalet li me
be! sond xwarin. 13 Û hejmara
kesên beşdarî vê sondê bûbûn,
çelî derbas dikir. 14 Vana çûn
cem serokên kahînan û kalepîran
û gotin: Me bi gotina, heta ku em
Pawlos nekujin, ger em tiştekî
tahm bikin, bila nalet li me be!
sondê xwarin. 15 Niha hûn, tevî
Civata Netewî, mîna lêgerînê hîn
jî bi kûrî, li ser rewşa di derheqê
Pawlos de bikin, ji fermandar rica
bikin ku bila wî ji we re bîne; em
jî, hîn berî ku ew nêzîk bê, bona
kuştina wî amade bibin!
16 Lê belê lawê xwuşka Paw-
los[2] bihîst ku wan kemîn danîne;
hate û ket kelehê û ji Pawlos re
têgîhand. 17 Pawlos jî serpelekî
bangî cem xwe kir û got: Vî xortî
ji fermandar re bibe, ji ber, tiştekî
ku bighîne wî heye! 18 Wî, ew
girt û bir cem fermandar û got:
Pawlosê girtî min bangî cem xwe
kir û rica kir ku ez vî xortî bînim
cem te; tiştekî wî yî bighîne te
heye. 19 Fermandar jî bi destê wî
girt û kişand aliyekî, pirsa: Tiştê
ku tu dixwaze bighîne min çî ye?
ji wî ve pirsî.
20 Û wî got: Cihûdan yekgotinî ki-
rin; mîna ku rewşa di derheqê Paw-
los de hîn jî bi kûrî lêgerînê bikin,
dê sibê ji te re rica bikin ku tu wî
bibî cem Civata Netewî. 21 Lê belê
tu bi wan nexape! Ji ber ku di nava
wan de ji çelî zêdetir kes, kemînê

1 Wêrek, cesûr.

2 Xwarziyê Pawlos.

danîne û li benda wî ne û bi gotina:
Heta ku em wî nekujin, ger em
tiştekî bixwin û vexwin, bila nalet
li me be! sond xwarin; niha amade
ne û li benda soza te ne. 22 Wê çaxê
fermandar bi gotina: Tu ji tu kesî re
nebêje ku te van tiştan têgîhandiye
min, temmî kir û yê ciwan berda.

*Pawlos bi Sezariyê ve tête şandin*

23 Û wî bangî du serpelî kir û got:
Bona saet di sisiyê şevê de herin
Sezariyê, du sed leşker, heftê siwarî
û du sedê bi rim amade bikin 24 û
bona ku hûn Pawlos li wê siwar
bikin û bi saxî bighînin cem walî
Fêlîks, heywanan jî amade bikin!
25 Û wî nameyek ûsa nivîsand:
26 Klawdiyo Lîsîas, ji waliyê
birêz Fêlîks re silav dike!
27 Cihûdan vî zilamî girtibûn
û hindik mabû ku wî bukujin;
çi heye ku dema min bihîst ew
niştewarê Romayê ye, ez bi
leşkeran ve gîhaştim û wî xelas
kirim. 28 Ji ber ku min dixwest
fêhm bikim ka wî bi çi sûcdar
dikin, min wî derxist ber Civata
Netewî ya wan. 29 Ez hîn bûm
ku, sûcdarî kirin di derheqê hinek
pirsgirêkên zagona wan de ye; lê
tu sûcdarî kirina hewceyî cezaya
mirinê, an jî hepsê dikir nedîtim.
30 Û dema ji min re hate têgîhan-
din ku ji aliyê Cihûdan ve kemî-
nek bona vî zilamî hatiye avêtin,
wî hema ji te re şandim. Min emir
da yên wî sûcdar dikin ku bila gi-
liyên xwe yî di derheqê wî de li
ber te bibêjin. Bi xatirê te!

*Li ber Waliyê Romayî*

31 Leşkeran li gor emrê ji wan
re hatiye dayîn, Pawlos girtin û
şevê birin Antîpatrîsê. 32 Wan,
dotira rojê siwariyan bona ku bi
Pawlos re biçin, berdan û dîsa
vegeriyan leşkergehê[2]. 33 Ew[1] jî
dema gîhaştin Sezariyê, nameyê
dan walî û Pawlos jî derxistin
pêşberî wî. 34 Piştî ku walî na-
meyê xwend, ji wî pirsî ku, ka ji
kîjan wilayetî ye û dema bihîst ku
ji Kîlîkyayê ye, got: 35 Ger yên
giliyê te dikin jî werin, wê demê
ez ê te guhdarî bikim! Û bona ku
wî di qesra Hêrodês de di bin ça-
van de bigirin emir da.

*Pawlos li ber Fêlîks*

24 Lê belê piştî pênc rojî, Se-
rokkahîn Henanya, hine-
kên kalepîran û xatîbek[3] navê
wî Tertûlûs e hatin; vana li dijî
Pawlos, gilî li walî kirin. 2 Dema
Pawlos hate bang kirin, Tertûlûs
dest bi sûcdarkirina wî kir û got:
3 Ya Felîksê xûpak[4], bi saya te,

[1] Siwarî, hespî.
[2] Kelehê.
[3] Gotarbêj. Dilpak, fezîletdar, an jî: Dewletî.
[4] Dilpak, fezîletdar, an jî: Dewletî.

em di nava dilxweşiya mezin de
dijîn; bi ewlekariyên ku te girti-
ye jî, pêşveçûnên bixêrhatî yên
di derheqê vî netewî de hatine
dîtin; em her tim û li her derê bi
hemûya şikiryê vêya qebûl dikin!
4 Lê ez naxwazim ku hîn jî zêde
te biwestînim; ez rica dikim ku, tu
çend gotinên ku em ê bibêjin, bi
dilxweşî guhdarî bikî.
5 Ji ber, me dît ku, ev zilama
fêsadek li her aliyê dinê di nava
Cihûdan de tevliheviyê derdixe û
ji serokên terîqeta Nasraniyan yek
e. 6 Heta ku bona gemar kirina
Perestgehê jî şuxulî; lê belê me
bi wî girt û me xwest ku li gor
zagona xwe daraziyê li wî bikin.
7 Lê belê fermandar Lîsîas hat û
bi gotina: Bila gilîkirên wî werin
pêşiya te, emir da û bi vî awayî
bi dijwariyekî mezin wî ji nav
destên me rahişt û bir. 8 Ger tu wî
bikişîne pirsiyariyê, tuyê ji wî hîn
bibe, hemû pirsiyariyên ku me di
derheqê wî de kirine rast in!
9 Û Cihûdan jî îdia kirin ku ev
tiştan wusa ne û beşdarî sûcdarî
kirinê bûn.

*Parastina Pawlos*

10 Li ser nîşanekî walî, Pawlos bi
vî awayî bersivê da: Ji ber ez di-
zanim ku, tu bi salên dirêj, daraz-
kiriyê ji vî gelî re dikî, ji bo tiştên
ku aidî min in, ez parastina xwe
bi kêfxweşî dikim. 11 Ji ber, tu
bi xwe jî dikarî hîn bibe ku, cergî
bona peristinê ez çûme Orşelîmê
ji donzdeh rojî zêdetir nebûyî.
12 Û wan, min ne li Perestgehê,
ne li keniştan, ne jî li cîhek dinî
bajêr nedîtine ku bi yekî re keti-
me guftegoyê, an jî bona gel serî
hilde xebitî me. 13 Û van sûcdar
kirinê heta niha dikin jî nikarin ji
te re îspat bikin. 14 Lê tevî vêya,
ez ji te re vêya îtiraf bikim ku, li
gor Rêya ku ew dibêjin terîqet, ez
qûlitiyê ji Xwedayê bapîrên xwe
re dikim; ez bi her tiştên ku di za-
gonê û pirtûkên peyxamberan de
hatiye nivîsandin bawer im 15 û
mîna ku wan bi xwe jî qebûl ki-
rine, min jî di derheqê, him yên
rast û him jî yên ne rast in de dê ji
mirinê ve bivejin, hêviya xwe bi
Xwedê ve girêdaye. 16 Û di vêya
de bona ku li ber Xwedê û miro-
van ûcdanek minî paqij hebe, ez
her tim dixebitim.
17 Û piştî cûdabûna gellek salan,
bona ku ez bexşandinan û qurba-
nan ji gelê xwe re bînim, hatim.
18 Û di wê navberê de, min di
Perestgehê de safîbûyî dîtin; ne
bi ajawe û galegalê; tenê hinek
Cihûdên ji Asyayê ne li wê derê
hebûn. 19 Ger tiştekî wanî li dijî
min bibêjin hebe, divê ew bên ber
te û sûcdarî kirinên xwe ji te re bi-
bêjin. 20 An jî, dema ez di nav wan
de disekinîm, ji bilî vê yek gotina
ku: Îroj, ez bona vejîna miriyan li

ber we tême darazî kirin! qêriyam;
21 gava ez li ber Civata Netewî
sekinîm, ka kî çi neheqî di min de
dîtine, bila bi xwe bibêjin!

*Fenekiya Walî Fêlîks*

22 Gava Fêlîks vêya bihîst, ji ber
ku di derheqê Rê de zanînekî wî
yî kûr hebû, wan taloqî rojekê din
kir û got: Ez ê biryara xwe ya di
derheqê doza we de ye, dema fer-
mandar Lîsîas were, bidim! 23 Û
wî emir da serpel ku, bila Pawlos
di bin çavan de, bi xwedî destûr-
bûnê ve bigire û dema hevalên wî
bixwazin alîkariyê bi wî re bikin,
bila ji tu kesî re astengiyan
dernexe.
24 Û piştî çend rojî Fêlîks, bi pîre-
ka xwe Dirûsîla, ya ku Cihûd bû,
hate, bangî Pawlos kir û di derheqê
baweriya Mesîh Îsa de wî guhdarî
kirin. 25 Lê belê dema wî qala ras-
tiyê, xwekontrolê û roja daraziyê
ku dê bê, kir, Fêlîks bi tirsê ve ket
û got: Niha tu dikarî here, dema
fersendê bibînim, ez ê dîsa bangî
te bikim! 26 Tevî vêya jî wî hêvî
dikir ku, dê Pawlos bertîlê bi wî
de; ji ber vê yekê zû bi zû bangî wî
dikir û bi wî re mijûlayî[1] dikir.
27 Û gava du sal derbas bûn pê ve,
di şûna Fêlîks de Porkiyo Fêstûs hat
û Fêlîksê xwest ku dilê Cihûdan qe-
zenc bike, Pawlos girêdayî hişt.

[1] Sohbet dikir.

*Pawlos li ber Fêstûs*

25 Gava ku Fêstûs hate wi-
layetê, paşê sê rojî ew ji
Sezariyê çû Orşelîmê. 2 Serokên
kahînan û pêşhatiyên Cihûdan,
giliyên xwe yî di derheqê Pawlos
de gîhandin wî. 3 Û bona ku bîne
Orşelîmê li dijî Pawlos ji xwe re
xêrê xwestin û ji Fêstûs re rica ki-
rin û bona ku wî di rê de bikujin
dek û dolavê ava kirin. 4 Lê belê
Fêstûs jî bersiva, Pawlos li Sezari-
yê bindest e, ew ê bi xwe jî di nêzîk
de here wir da û got: 5 Yên di nava
we de rayedar in, bila bi min re
werin û ger di wî zilamî de tiştekî
çewt hebe, bila wî sûcdar bikin!
6 Lê belê piştî ku ew ji deh rojî zê-
detir di nava wan de ma; vegeriya
Sezariyê û dotira rojê ew di kursi-
ya darazkirinê de rûnişt û emir da
ku bila Pawlos bînin. 7 Û dema ew
ket hundir, Cihûdên ji Orşelîmê
ve hatibûn, dora wî girtin û gel-
lek sûcê giran ku nikaribûn wan
îspat bikirina li wî kirin. 8 Paw-
los bi gotina: Min ne li dijî zagona
Cihûdan, ne li dijî Perestgehê, ne
jî li dijî Qeyser tu sûcî nekiriye!
xwe parast.
9 Lê belê Fêstûs xwest dilê Cihû-
dan qezenc bike, bi vî awayî ber-
sivê da Pawlos û got: Tu dixwazî
here Orşelîmê û wê derê li ber min
ji van babetan ve bê daraz kirin?
10 Lê belê Pawlos got: Ez li ber
kursiya Qeyser ya darazkirinê ve

disekinim; divê ez li vir bême da-
raz kirin! Mîna ku tu jî baş dizanî,
min li dijî Cihûdan qet neheqiyekî
nekiriye. 11 Ji ber ku ger neheqi-
yek kiribim û tiştekî ku liyaqî
mirinê ye kiribim, ez ji mirinê
ve xwe nadim alî. Lê belê ger tu
tiştê ku vana min bisûcdarî dikin,
ne rast bin, tu kes nikare min bide
destê wan. Ez doza xwe pêşkêşî
Qeyser dikim!
12 Wê gavê Fêstûs, paşî ku bi sa-
zûmanê re şêwirî, bersivê da: Te
doza xwe pêşkêşî Qeyser kir; tuyê
here cem Qeyser!

*Fêstûs bi qiral Agrîpa ve dişêwire*

13 Piştî ku çend roj derbas bûn,
qiral Agrîpa û Bernîkî[1] hatin Se-
zariyê û silavê dan Fêstûs. 14 Û
piştî ku ew gellek rojan li wir
man, Fêstûs; doza Pawlos pêşkêşî
qiral kir û got: Zilamekî ku ji aliyê
Fêlîks ve girtî hatiye hiştin heye;
15 dema ez li Orşelîmê bûm, se-
rokên kahînan û kalepîrên Cihû-
dan, giliyên xwe yî di derheqê wî
de ji min re gotin û xwestin ku ez
wî bi ceza bikim.
16 Bi gotina, berî ku kesê tête
sûcdarî kirin bi gilîkaran re rûbirû
neyê kirin û berî dayîna fersenda
li dijî tometa ku di derheqê xwe
de ye mafê parastinê jê re nehati-
be dayîn, dayîna wî ne kevneşopa
Romayiyan e, bersivê dam wan.
17 Û dema ew li vir civiyan, min
tu wext derbas nekir, dotira rojê li
ser kursiya darazkirinê ve rûniştim
û bona ku zilam bînin emir dam.
18 Gava ku dawedarên rabûn û
axifîn, tu sûcdariyek ku ez li ben-
da wê me, li wî nekirin; 19 tenê di
derheqê ola wan û mirovek mirî
ye, lê belê li gor îdia kirina Pawlos
ve hîn dijî, navê wî Îsa ye de, li dijî
wî hinek pirsgirêkên wan hebûn.
20 Ji ber nizanîbûm ku ez ê çawa
di derheqê van tiştan de lêpirsînê
bikim, min ji wî re pirsî ku, bi çûna
Orşelîmê û li wir di derheqê van
tiştan de, bi darazbûnê razî ye, an
jî na. 21 Lê belê bona ku Pawlos
doza xwe gîhand Qeyser[2], li gor
biryara Împarator xwest ku bin-
dest[3] bimîne; min jî emir da, heta
roja ku ez wî bişînim cem Împara-
tor, bila girtî bimîne.
22 Lê belê Agrîpa ji Fêstûs re got:
Ez jî dixwazim ku vî zilamî guh-
darî bikim! Û wî got: Tuyê sibê
wî guhdarî bikî!
23 Dotira rojê gava ku Agrîpa û
Bernîkî, bi debdebeyekê mezin
hatin û bi fermandar û pêşhatiyên
bajêr ve ketin dîwanxanê; li ser
emrê Fêstûs, Pawlos anîn hundir.
24 Û Fêstûs got: Qiral Agrîpa û

1 Bernîkî: Xwuşka Agrîpa bû.
2 Împarator.
3 Girtî bimîne.

hemûyên ku li vir bi me re ama-
de ne! Hûn vî zilamî dibînin, li
Orşelîmê û li vir, hemûya civaka
Cihûdan bona viya, bi gotina: Êdî
jiyîna wî ne rast e! qêriyan û li min
gilî kirin. 25 Lê belê min, tiştekî
wî liyaqî mirinê yî kiribe nedît û ji
ber ku wî bi xwe doza xwe pêşkêşî
Awgûstos kiriye, bona şandina wî
min biryar da. 26 Tu tiştên bi rastî
nîne ku ez bona wî ji Efendiyê
me re binivîsim; bo vê yekê min
wî derxist ber we, bi taybetî jî ya
qiral Agrîpa, wî derxistim ber te;
bona ku paşî lêkolînê tiştekî minî
ez binivîsim bila hebe. 27 Ji ber
ku girtiyekî şandin û sûcên ku li
dijî wî ne agahî nekirin, ji min re
bêwate xuya dike.

*Parastina Pawlos ya li ber qiral Agrîpa*

26 Û Agrîpa ji Pawlos re got:
Ji te re destûr heye ku tu ji
bo xwe bêje[1]! Wê gavê Pawlos
destê xwe dirêj kir û bi vî awayî
dest bi parastina xwe kir:
2 Ya qiral Agrîpa! Ez xwe dilxweş
dihesibînim; ji ber ku ez ê îroj pa-
rastina xwe yî di derheqê hemû
sûcdar kirinê Cihûdan de li ber
te bikim. 3 Bi taybetî ez bi vêya
kêfxweş dibim ku, tu mirovekî
hemû adet û pirsgirêkên Cihûdan
ji nêz de dizanî ye. Ji bo vêya, ez
ji te rica dikim ku tu bi sebir min
guhdarî bike.
4 Hemûyên Cihûdan, dizanin ku
divê di destpêkê de li welatê min,
divê jî li Orşelîmê, di ciwaniya
min de ez çawa dijiyam. 5 Min ji
berê ve dinasin û ger bixwazin, ka-
rin şahdeyiyê bikin ku, ez endamê
mezheba ola me ya herî dijwar, bi
mezheba Fêrisiyan girêdayî ve
jiya me. 6 Û niha, ji ber ku, min
hêviya xwe bi wad a ku Xwedê
daye bapîrên me ve girêdayiye
li vir disekinim û tême daraz ki-
rin; 7 donzdeh eşîrên me, bi şev
û roj, bi xîret ji Xwedê re qûlitî
kirinê ve hêvî dikin ku bigihêjin
wê wadê. Ya qiral, sûcdariyên ku
Cihûdan li min dikin, di derheqê
vê hêviyê de ye! 8 Ma vejîna ku
Xwedê miriyan divejîne, çima ji
bo we tiştekî pê nayê bawer kirin[2]
tête hesibandin?
9 Bi rastî min jî li gor xwe digot
ku, qey li dijî navê Îsayê Nis-
rêtî, hewcedariya kirina gellek
tiştî heye. 10 Û vêya jî min li
Orşelîmê çê kir û bi rayedariya ku
min ji serokên kahînan ve sten-
dibû, min gellekê pîrozan avêtin
girtîgehê û dema ew hatin kuştin,
min raya xwe li dijî wan da. 11 Ez
li hemû kenîştan digeriyam û zû
bi zû min wan bi ceza dikir, bona
kufrê bikin, zorê didam wan û ez

[1] Tu dikarî xwe biparêze!

[2] Bêîmkan, bê derfet.

ûsa har bûbûm ku, bona zulmê li
wan bikim, diçûm bajarên biyan
yên ew li wir dijîn jî.
12 Di vê navberê de gava ez
bi rayedarî û wezîfeya serokên
kahînan ve diçûm Şamê; 13 di
wexta nîvrojê de, ya qiral, di rê
de, min şewleyekî ji şewla rojê
zêdetir dibiriqe dît, ji ezman
ve hat û dora min û yên bi min
re diçûn ronî kir. 14 Û gava em
hemû ketin erdê, min bihîst ku,
dengekî di zimanê Îbraniyan de ji
min re dibêje: Saûl! Saûl! Çima tu
zulmê li min dikî? Li dijî mesasê[1]
rabûnê, tu xesarê didî xwe!
15 Min jî got: Ya Xudan, tu kî
yî? Û Xudan got: Ez Îsayê ku tu
zilmê li wî dikî me! 16 Lê belê
rabe û li ser pêlan bisekine! Ji
ber, him di tiştên ku tu dibîne de,
him di tiştên ku ji te re xuyanî di-
bim de, bona te wekî xizmetkar
û şahde wezîfedar bikim, ez ji te
re xuyanî bûm. 17 Ez ê te ji destê
gel û neteweyên ku niha te ji wan
re dişînim ve xelas bikim; 18 da
ku, ez te bona çavên wan vekim
û wan ji tariyê vegerîne ronahiyê,
ji serweriya Îblîs vegerîne Xwedê
dişînim; ûsa ku, bila bi min ba-
weriyê bînin û bigihêjin efûbûna
gunehan û di nava yê pîroz hatine
danîn de mêrasê bigirin!
19 Ji bo vêya, ya qiral Agrîpa,
min li dijî çûna vê xewn û xeyala
semavî nekir[2]; 20 lê belê min pêşiyê
ji yên ku li Şamê ne re û ji yên ku
li Orşelîmê û li hemûya herêma
Cihûstanê ne re û ji neteweyan re
jî gîhandim ku, bila tobe bikin û
vegerin Xwedê û karên liyaqî tobê
ne bikin. 21 Ji ber vê yekê Cihûdan
min li Perestgehê ve girtin û
xwestin ku bikujin. 22 Lê belê heta
îroj, Xwedê bûye alîkarê min, bi
vê sayê ez li vir disekinim û biçûk
û mezin, ji hemû kesî re şahdeyiyê
dikim; gotinên ku ez dibêjim,
xeynî gotinên peyxamberan û yên
Mûsa ji berê ve gotine tiştek din
nîn in; 23 yanê, wan têgîhandibûn
ku, dê Mesîh êşê bikişîne û bi
yekemînbûna kesên ji mirinê ve
vejiyane, divê him ji gel û him jî ji
neteweyan re mizgîniya ronahiyê
bide bihîstin[3].

*Pawlos Mizgîniya Îsa Mesih ji Agrîpa re dibêje*

24 Û dema wî bi vî awayî paras-
tina xwe didomand, Fêstûs bi
dengekî bilind got: Pawlos, tu har
bûyî! Zêde xwendin te dîn dike!
25 Lê belê Pawlos got: Fêstûsê
birêz, ez har nebûme; lê gotinên rast
û li gor aqilê ne dibêjim! 26 Ji ber,
qiralê ku bi cesaretê jê re dibêjim jî

1 Şiva sertûj.
2 Ez li pey wê çûm.
3 Îlan bike.

bi van tiştan dizane. Ji ber ku ez di
wê qenîetê de me ku, yekî ji vana
jî jê re ne veşartî ne; ji ber ku ev di
qozîkek de nehatine çêkirin! 27 Qi-
ral Agrîpa, ma tu bi peyxamberan
bawer dikî? Ez dizanim ku tu ba-
wer dikî!
28 Agrîpa ji Pawlos re got: Ma
tuyê di demekî ûsa kurt de min
qanih bike û bike Mesîh î?
29 Lê belê Pawlos got: Dixwaze
bila di demekî kurt de, dixwaze
jî di demekî dirêj de bibe, ez ji
Xwedê dixwazim ku tenê ne tu,
hemû kesên ku îroj li min guhdarî
dikin, li xeynî van zincîran mîna
min bibin!
30 Û gava wî vêya got, qiral, walî,
Bernîkî û yên bi wan re rûniştibûn
rabûn. 31 Û gava şunda vekişîn,
di nava xwe de axifîn û gotin: Ev
zilam tiştekî ku ya hewceyî cezayê
mirinê, an jî girtîbûnê dike, nake[1]!
32 Lê belê Agrîpa ji Fêstûs re got:
Ger vî zilama doza xwe neşanda
Qeyser, dikarîbû serbest bihata
berdan!

*Rêwîtiya Pawlos ya ber bi Romayê*

27 Dema biryar hate dayîn ku
em bi keştiyê ve herin Îtal-
yayê, Pawlos û hinek girtiyên din
dan destê serpelekî navê wî Yûlyûs
e û ji tabûra Awgûstos e. 2 Em li
keştiyek Edremîtê ya dê serî bide
hinek strîngehên li qeraxên Asyayê
siwar bûn û vebûn behrê; ji Se-
lanîkê ve Arîstarkoyê Makêdonî jî
li cem me bû.
3 Û dotira rojê me serîkî da Say-
dayê û Yûlyûsê bi hevaltî nêzîkî
Pawlos dibû, bona hewcedari-
yên xwe peyda bike hişt ku biçe
cem hevalên xwe. 4 Û em ji wir
ve vebûn û ji bin bayê Qibrisê
ve derbas bûn, ji ber ku ba li dijî
me bû. 5 Û em ji behra Kîlîkya
û Pamfîlyayê derbas bûn û hatin
bajarê Mîra ya Lîkyayê. 6 Serpelê
ku keştiyek Îskenderiyê ya dê
here Îtalyayê li wir dît, me li wê
siwar kir.
7 Di nava gellek rojan de hêdî bi
hêdî bi rê girtinê ve, bi zorekê em
gîhaştin nêzîkî qeraxên bajarê Knî-
dosê; ji ber ku bahoz astengiyê ji
me re derxist, em ji pozê Salmonê
ve fitilîn û di bin bahozê Kirêtayê
de me derbas kirin 8 û bi zorekê di
qeraxê de em pêş ve çûn û hatin
cîhê nêzîka bajarê Laseyê ku, navê
wê Strîngehên Xweşik in bû.
9 Gellek wext hatibû buhirandin
û ji xwe, ji ber ku Rojî derbas
bûbû û êdî rêvîtiya behrê bi xe-
ter bûbû, Pawlos şîretê li wan kir
10 û ji wan re got: Efendîno, ez
dibînim ku, ev rêvîtiya dê tenê xe-
sarê nade bar û keştiyê, dê gellek
xesar û xerabiyê bide canên me jî!

[1] Tiştekî vî zilamî ya hewceyî cezayê mirinê, an jî girtîbûnê bigire nîne!

11 Lê belê serpel, ji gotinên ku ji aliyê Pawlos ve têne gotin zêdetir bi serok û xwediyê keştiyê ve bawer dikir. 12 Ji ber ku strîngeh bona borîna zivistanê ne bikêrhatî bû, gellekan biryar dan ku ji wir vebin û ger mimkûn be bigihêjin strîngeha Fînîksê ya li bayê reş û bayê başûrê ve girtiye û ya Kirêtayê ye.

*Bahoz*

2.Kor 11,25-26

13 Û dema ji başûrê bayek qels hat, gotin qey dema ku li bendê ne hat û hesinên xwe girtin[1]; di nêzîka qeraxên Kirêtayê de dest bi pêşveçûnê ve kirin. 14 Lê belê hîn pirr derbas nebûbû, ji giravê ve bahoza ku jê re dibêjin: Evrakîlon teqiya. 15 Û dema keştî li ber bahozê nikarîbû biçe, me xwe bi herikandinê ve berdan. 16 Lê belê gava em li ber giravek biçûk, ya ku jê re Klauda tête gotin derbas dibûn, me bizorkê lotkê zeft kirin. 17 Û piştî ku wê girtin jor, bi werisan[2] ji bin ve dora keştiyê girtin; ji ber, ditirsiyan ku li xalîca Sîrtê dê li ser zinaran ve biqewimin[3], taximên babirekê daxistin û bi vî awayî xwe bi ber herikandinê ve berdan. 18 Ji ber ku bahozê me gellekî êşandibû, roja din ji keştiyê dest bi avêtina baran kirin 19 û roja sêwemîn, taximên keştiyê bi destên xwe ve avêtin behrê. 20 Gellek rojan ne roj, ne jî stêrk hatin xuya kirin û ji ber ku bahoz bi hemû dijwariya xwe didomand, êdî me hêviya xwe yî xelasiyê bitumî winda kiribû.

21 Û dema ku ew demek dirêj bê xwarin man, Pawlos wê gavê di navenda wan de sekinî û got: Efendîno, divê we min guhdarî bikirina û ji Kirêtayê veneqetiyana û rastî vê xesar û ziyanê nehatina. 22 Û niha ez ji we re dibêjim bi metirsî bin; ji ber ku dê ji nava we tu can winda nebe, dê tenê keştî mehf bibe! 23 Ji ber ku milyaketekî Xwedayê ku ez aidî wî me û qûlitiyê ji wî re dikim, îşev hate cem min û got: 24 Metirse, Pawlos! Hewce dike ku tu derkevî ber Qeyser û a vay, Xwedê hemû kesên bi te re rêwîtiyê dikin ji te re bexşandiye! 25 Ji bo vêya, efendîno, bi metirsî bin! Ji ber, ez ji Xwedê bawer im ku, dê mîna ku ji min re hatiye gîhandin bibe. 26 Lê belê hewce dike ku em li giravekê rûnin erdê!

*Keştî li erdê ve rûdine*

27 Û gava şeva çardehan hat, em hîn di behra Adriyayê de diherikîn;

1 Bi rê ve ketin.

2 Tenaf.

3 Di axê de rûnin.

nêzîkî nîvê şevê keştîvanan got ku
qey nêzîkî giravê[1] bûne 28 û kûriti-
ya behrê pîvan û dîtin ku bîst qulac
e; paşî hinek pêş ve çûn, carek din
jî pîvan, dîtin ku panzdeh qulac e.
29 Ji qewimandina zinaran ve tir-
siyan û ji aliyê dawiyê ve çar he-
sinan[2] avêtin û bona ku roj bihilê
dua kirin. 30 Keştîvanan bona ji
keştiyê ve birevin xebitîn û dema
wekî ji serî ve hesin bavêjin lotkê
daxistin behrê; 31 Pawlos ji serpel
û leşkeran re got: Ger ev li keştiyê
nemînin, hûn nikarin xelas bibin!
32 Wê gavê leşkeran bend jêkirin
û lotkê xistin behrê.
33 Û gava ku dikira roj bihilata,
Pawlos bona xwarinê bixwin ji
wan hemûyan rica kir û got: Îroj
çardeh roj e hûn di nav sekinayi-
yekî xemgînî de ne, we tu tiştekî
nexwarin û hûn birçî ne. 34 Ji bo
vêya ez ji we rica dikim ku, xwa-
rinê bixwin; ji ber ku bona xela-
siya we ev hewce dike; ji ber ku
dê ji serê we yekî, mûyekî porên
we winda nebe! 35 Piştî ku vêya
got, nan rahişt û li ber hemûyan
ji Xwedê re şikir kir û wê parî
kir û dest bi xwarinê ve kir. 36 Û
hemûyan wêriyan û wan jî xwa-
rinê xwarin. 37 Di keştiyê de em
bi hemû du sed û heftê û şeş can[3]
bûn. 38 Û piştî ku ew ji xwarinê
ve têr bûn, genim rijandin behrê û
keştiyê sivik kirin.
39 Dema bû roj[4], reşayiyê nas
nekirin; lê belê xalîcek bi seylax
dîtin û di derheqê, gelo em ê bi-
karibin keştiyê bi wir ve bajon de,
pendan li hev kirin. 40 Hesinan
jêkirin û di behrê de hiştin; di yek
demê de bendên dimenê jî jêkirin
û babireka pêşiyê dan ber ba û bi
vî awayî berê keştiyê dan sêlxanê[5].
41 Keştî li bilindahiyek qûmê ve
qewimî û li erdê ve rûnişt; serê
keştiyê di qûmê de çikiya û se-
kinî û qet neleqiya, lê belê paşiya
keştiyê bi dijwariya pêlan ve dest
bi belav kirinê ve kir.
42 Leşkeran, bona ku tu girtî di
avê de ajne nekin û nerevin, di
nêta kuştina wan de bûn[6]. 43 Lê
belê serpel, xwest ku Pawlos xelas
bike û wan ji kirina nêta wan ve
da sekinandin. Û bi gotina, pêşiyê
yên ku ajnê dizanin xwe bavêjin
behrê 44 û yên li şunda mane jî,
hinekan li ser textan, hinekan
jî li ser tiştên ku ji keştiyê ne ve
derkevin reşayiyê, emir da. Û
bi vî awayî wusa bû ku, her kes
xelas bûn û derketin reşayiyê.

*Li Maltayê*

28 Dema ku em xelas bûn, me
fêhm kir ku navê giravê

---

[1] Erdê, axê.
[2] Çapa.
[3] Kes.
[4] An jî: Dema sibe bû.
[5] Qeraxa bi qûm.
[6] Difikirîn ku wan bikujin.

Malta ye. 2 Û xwecîhan[1] mirovahiyek nehatiye dîtin rê me dan; ji ber, bona barana ku dibariya û sermê agir vêxistin û me hemûyan qebûl kirin. 3 Gava ku Pawlos komek qirşik da hev û avêt ser agir, margîskek ji germayiyê ve derket, hat û bi destê wî ve girt. 4 Dema xwecîhan heywanê bi destê wî ve daliqiye dîtin, ji hev û din re gotin: Bê şik ev zilama qesas e; ew ji behrê ve xelas bûbe jî, lê belê dadiyê[2] wî ji jiyanê re nehişt! 5 Çi heye ku, wî destê xwe dawişand û heywanê avêt nava agir û tu xesarê nedît. 6 Lê belê ew li benda nepixandina Pawlos, an jî ji nişka ve bi mirîtî ketina wî yî erdê bûn; lê belê demek dirêj sekinîn û dîtin ku tiştekî ziyandar bi wî nebû, fikrên xwe guhertin û gotin: Ev îlahek e!

*Pawlos nexweşan baş dike*

7 Nêzîkî wê derê çewlîgên serrayedarê giravê Pobliyo hebûn; wî, me qebûl kir û sê rojî bi nazikî em kirin mêvan. 8 Di wê navberê de, bavê Pobliyo bi virika bi xwîn ve ketibû û di nava agiran de radiket. Pawlos ket cem wî û dua kir, destên xwe danî ser wî û wî baş kir. 9 Û li ser vê bûyerê nexweşên dinî giravê jî hatin û şîfa dîtin. 10 Wan jî me bi gellek xelatan ve bi rûmet kirin; wexta ku em ê vebûna behrê hemû tiştên em hewcedar bûn, li keştiyê ve bar kirin.

*Gîhaştina Romayê*

11 Piştî sê mehî, em bi keştiyekê Îskenderiyê ya zivistanê li giravê derbas kiriye, ya ku nîşana Dîoskûren[3] lê ye, vebûn behrê.
12 Me serîkî da Sîrakûzayê û sê rojî
li wir man. 13 Û li wir jî me rêya
xwe domand û em hatin Rêgîûmê;
paşî rojek din bayê başûrê derket û em roja duwemîn gîhaştin
Pûteoliyê. 14 Birayên ku me li wir
dîtin, bona ku em heft rojî li cem
wan bimînin, li ber me geriyan. Û
bi vî awayî, em gîhaştin Romayê.
15 Gava ku birayan xebera me girtin, bona pêşwaziyê li me bikin, ji wê derê hatin heta Sûka Apiyoyê û Sê Xanan. Dema Pawlos wan dît, ji Xwedê re şikir kir û wêriya.
16 Dema em ketin Romayê, serpel girtiyan da fermandarê artêşgehê; lê belê ji bona Pawlos û leşkerê ku wî di bin çavan de disekinîne tenê bimînin, destûr hate dayîn.

*Pawlos ji Cihûdan re Mizgîniya Îsa Mesîh dibêje*

17 Û wusa bû ku, piştî sê rojî wî bona civakê bangî pêşhatiyê Cihûdan kir û dema vana civiyan, wî ji

1 Gelê wê giravê.
2 Xwedayê dadiyê, navê pûtek Grekan bû.
3 Xwedanê cot.

wan re got: Birano, min tiştekî li
dijî gel, an jî adetên kalikên me
nekiriye, lê dîsa jî li Orşelîmê ha-
tim bindest kirin û min dan destê
Romiyan. 18 Wan jî piştî ku min
kişandin pirsiyariyê, xwestin ku
min serbest berdin; ji ber, bona
kuştina min sedemek tunebû.
19 Lê belê dema Cihûdan li dijî
vêya axifîn, çawa ku tu giliyê
min ji netewa min ve tunebû, lê
ez hewcedar bûm ku doza xwe
pêşkêşî Qeyser bikim. 20 Niha ji
ber vê yekê, bona dîtin û axaftinê,
bangî we kirim; ji ber ku bona
hêviya Îsraêlê ez bi vê zincîrê ve
girêdayî me!
21 Wan jî ji wî re gotin: Me ji
Cihûstanê nameyek di derheqê te
de nestendine û yek ji birayan ne-
hat vir û negîhand me, an jî di der-
heqê te de tiştek xerab negotine.
22 Lê belê em dixwazin, tiştên ku
tu difikirî, ji te bibihîzin; ji ber ku
bona vê firqeyê[1] em dizanin ku, li
her derê li dijî wê tête axaftin.
23 Û ji wî re rojekê tayîn kirin[2] û
gellek kes hatin cem wî, mala ku
lê dima. Bi şahdeyî kirina ji Ser-
weriya Xwedê re, ji zagona Mûsa
û ji peyxamberan ve bona wan di
derheqê Îsa de qanih bike, xebitî
û ji sibê heta êvarî ji wan re got.
24 Hinek kes bi gotinên wî ve ba-
wer bûn û hinekan jî bawer nebûn.
25 Û dema li hev nekirin, piştî ku
Pawlos wê gotina got, ew çûn:
Ruhê Pîroz yê bi navgîniya Îşaya
peyxamber ve bangî bapîrên me
kir, rast got: 26 Here û ji vî gelî re
bibêje: Hûn ê bi guhan ve bibihîzin
û qet nikaribin fêhm bikin û hûn ê
bi çavan ve binihêrin û qet nika-
ribin bibînin! 27 Ji ber ku dilê vî
gelî stûr bû û bi guhê xwe ve giran
bihîstin, çavên xwe jî girtin; nebe
ku, bila bi çavên xwe ve hilbijêrin
û bi guhên xwe ve bibihîzin, bi
dilên xwe jî fêhm bikin û dîsa ve-
gerin, ku ez ê şifê bidim wan[3].
28 Niha vêya bizanibin ku, ev
xelasiya Xwedê ji neteweyan re
hatiye şandin û dê ew ê guhdarî
bikin! 29 Û dema wî van gotinan
got, Cihûdan di nav hev de zehf
keftûleftê kirin û çûn.

*Pawlosê Şahdeyê Îsa Mesîh li Romayê*

Ef 6,19-20; Fîl 1,12-14;
Kol 1,24-29; 4,3-4

30 Û Pawlos, bêkêmasî du sal li
mala ku wî ji xwe re kirê kiriye
ma û her kesê ku hatin ziyareta wî
qebûl kir. 31 Û Serweriya Xwedê
bêyî hemû astengiyan, bi hemûya
cesaretê ve dida bihîstin û rasti-
yên di derheqê Xudan Îsa Mesîh
de dida hîn kirinê.

---

[1] Rêolê, mezhebê.
[2] Rojekê bijartin.
[3] Îşaya 6:9-10

# NAMEYA PAWLOS YA JI ROMIYAN RE

SERETA MIZGÎNIYA XWEDÊ

*Pêşgotin*

Di sedsala yekemîn de bona perwerde kirin, bi metirsî kirin û di girêdana Mesîh de zexm kirina Civaka bawerkiran (Dêrê), ya li her alî ve belavbûyî, nameyên bi peyxama Xwedê ve hatine nivîsandin hatin şandin. Hejmara van nameyan bîst û yek in. Babeta bingeh ya van nameyan, perwerdekirina civakan, di rêya Xwedê û rastiyê de perwerde kirina mirovan û rêvebirina civakan bû. Bona nivîsandina ji vana sênzdehan, Xwedê peyxama xwe da nûçevan Pawlos.

Ev nameya ji Romiyan re di sala 58'an de, ji aliyê Pawlos ve di gera sêwemîn de, li bajarê Korîntê hatiye nivîsandin, herî girîng e. Name, ji du pariyê girîng ve hatiye ava kirin. Hînkirin (Birra 1-11); Tetbîq Kirin (Birra 12-16). Babeta bingehîn, gunehkariya mirov e; bi bawerkirina Îsa Mesîh ve, bi rastiyê ve xemilandin û bi Ruhê Pîroz ve tijî bûn û jiyana ku Xwedê xoşnûd dike pêkanîn e.

Di birra yekemîn de sê babetên di derheqê mirovan de derdikeve pêşiya me:

1. Bisûcbûna gerdûnî (1-3)
2. Gunehkariya mirov (7:15-24)
3. Xwestina Xwedayê Serwer (9:7-18)

Mirov dikare vê nivîsa bi vî awayî kurt bike:

1. Hewcedariya her kesî heye ku bi rastiyê ve bê xemilandin 1: 1-3:20
2. Bi sûcî biryar e, rastî bi xêrê ve tê û xaleta Xwedê ye 3:21-5:11
3. Bi Adem re yekitî, bi Mesîh re yekitî 5:12-7:25
4. Bitûmîbûna pêşniyarên Xwedê 8:1-9:5
5. Yên li gor xwestina Xwedayê Serwer hatine bijartin 9:6-11:36
6. Jiyana kesê ku bawerî bi Mesîh aniye 12:1-16:27

*Destpêk*

Tît 1,14; Gal 1,1-5

1 Pawlosê qûlê Îsa Mesîh, ê ku ji
bona bibe şagirt, hatiye dawet
kirin ji Mizgîniya Xwedê re hatiye hilbijartin[1] – 2 ew Mizgîniya
ku wî bi navgîniya peyxamberên
xwe, ji berê ve di Nivîsên Pîroz

1 An jî: Ji bo belav kirina Mizgîniya Xwedê hatiye hilbijartin, (tirxan kirin).

de wad kiriye, 3 li gor bedenê ji
nîjada Dawid ve bûye 4 û li gor
ruhê pîroziyê, bi vejîna ji mirinê
û bi qûdretê Lawê Xwedê hatiye
bang kirin[1], di derheqê Lawê wî,
Xudanê me Îsa Mesîh de ye; 5 di
hemû neteweyên ku hûn jî di nav
wan de vexwendiyê[2] Îsa Mesîh in,
6 bona ku bona navê wî îtaetê ji
baweriyê re bikin, me bi navgî-
niya wî xêr û wezîfeya şagirtiyê
stendin – 7 ji hemû xoşewîstên
Xwedê, ên ku li Romayê ne û
bona pîrozbûnê hatine dawet ki-
rin re: Bila ji Bavê me Xwedê û ji
Xudan Îsa Mesîh ve xêr û xweşî
ji we re be!

*Dua û spasî*

Rom 15,23-33; 1.Sel 1,2-10

8 Pêşiyê bona we hemûyan, bi
navgîniya Îsa Mesîh ve ji Xwe-
dayê xwe re şikir dikim ku, bawe-
riya we li hemûya dinê tête bang
kirin[3]. 9 Ji ber ku Xwedayê ez
bona belav kirina Mizgîniya Lawê
wî, bi ruhê xwe ve jê re xizmetê
dikim şahde ye ku, 10 ez we çawa
bêsekin, her tim di duayên xwe de
di bîr ve tînim; bi xwestina Xwe-
dê, ya dawîn bona hatina cem we
ez dixwazim ku rêyek ji min re bê
vekirin. 11 Ji ber ku bona hûn ji
aliyê ruh ve zexm bibin, xelatek
ruhanî bigihînim we, zehf dixwa-
zim ku ez we bibînim. 12 Yanê,
dixwazim bibêjim ku, dema ez di
nava we de bim, ez bi ya we, hûn
jî bi ya min, em ê bi baweriya xwe
xemrevîniyê[4] bibînin.
13 Ya birano, ez naxwazim ji we
re nenas bimîne ku, mîna di nava
neteweyên din de, bona ku şuxlên
min di nava we de jî dexlê bide,
pirr caran min nêt anî ku ez werim
cem we; lê belê heta niha hatim
men kirinê. 14 Berpirsiyartiya
min li berya kesên Grek û yên
Barbar, ji zaniyaran û ji nezanan
re heye. 15 Bi vî awayî, ez amade
me ku ji we re, ji yên ku Romayê
ne re, Mizgîniyê heta ku ji destê
min ve bê waz bikim.

*Hêza Mizgîniya Mesîh*

1.Kor 1,18-24; Rom 3,21-26

16 Ji ber ku ez ji Mizgîniya
Mesîh[5] fedî nakim; ji ber ku ew
pêşiyê ji Cihûdan re, dawiyê jî
ji Grekan re, bona xelasiya her
bawerkiran hêza Xwedê ye.
17 Ji ber ku pakbûna[6] Xwedê di
wê de ji baweriyê, heta baweriyê
tête doz kirin; herweha hatiye ni-
vîsandin: Lê belê dê salih bi ba-
weriyê ve bijî[7].

---

1 Hate îlan kirin.
2 Bangkiriyê.
3 Tête îlan kirin.
4 Teseliyê.
5 An jî: Ji Încîla Mesîh.
6 Başbûn, an jî: Rastiya Xwedê.
7 An jî: Mirovê rast dê bi baweriyê ve bijî.

*Xezeba Xwedê li dijî hemû*
*bêxwedaniyê ye*

Zeb 19,2-5; K.Şa 14,16-17,24-32;
Îşa 44,9-20; Ef 4,17-19

18 Lewma li dijî hemû bêxwe-
danî û neheqiya mirovên ku bi
neheqiyê dibin astengê rasteqî-
niyê, xezeba Xwedê ji ezman ve
tête nîşan dayîn[1]. 19 Ji ber, çi ku
di derheqê Xwedê de tê zanîn
li ber çavan e; ji ber ku Xwedê
hemûyî raxistiye ber çavên wan.
20 Ji ber ku ji afirandina dinê ve,
xisûsiyetê wî yên ku nayên dîtin,
yanê, hêza wî ya bêdawî û Xwe-
daniya wî bi kirinên wî tê fêhm
kirin ku, bi eşkeretî tê dîtin; bo
vê yekê uzrê[2] wan nîne. 21 Ji ber
ku Xwedê dizanîbûn jî, dîsa wî bi
Xwedayî bilind nekirin û ji wî re
şikir nekirin; lê belê di fikrên xwe
de ketin ehmeqiyê; tariyê jî dilê
wanî fêhm nake girt. 22 Gava ku
wan digotin em baqil in, ew bêa-
qil bûn 23 û bilindahiya Xwedayê
bê mirin bi senemên[3] mîna miro-
vên bi mirin, civîkan, çarlingan û
marîjokan ve guhertin[4].
24 Bo vê yekê, Xwedê, bona
bedenên xwe rezîl bikin, wan di
nav şehwetên[5] dilê wan de berda
pîsîtiyê. 25 Wan, rastiya Xwedê
bi derewê ve guhertin û ji Xalik
zêdetir, bi mexlûq ve peristîn û
qûlitiyê kirin; ew abadîn bimba-
rek e[6]! Amîn.
26 Ji ber vê yekê Xwedê wan da
azweriyên şermî; ji ber ku heta
pîrekên wan jî dêvla têkiliyên
xwezayî[7], yên ne xwezayî bijar-
tin 27 û mîna wê, zilaman jî tê-
kiliyê xweza yên pîreka berdan û
di şehwetên xwe de bi hev û din
re[8] vêketin û şewitîn; zilam bi zi-
laman re ket têkiliyên şermî û di
xwe de bersiva ku liyaqî ji rê der-
ketinê ye girtin.
28 Û ji ber ku di zanîna xwe de
hebûna Xwedê minasîb nedîtin,
Xwedê jî bona tiştên ku ne li cîh
in bikin, wan da destê ramanên
merdût[9]. 29 Mafnezaniya bi her
awayî, bi xerabî, bi çavnebarî, bi
gir û hêrsê ve tijî bûn; bi hesûdî,
bi hêrsa kuştinê, bi koşînê, bi hîlê
û bi nêta xerab ve tijî ne.
30 Yên ji Xwedê ve dikerihin,
kesên pirsguhêz, rexnekir, qurre,
bikubr, pesnê xwe vedidin, xe-
rabiyê dikin, ji dayik û bavan re
îtaetê nakin, 31 fehmkor, li ser
soza xwe nasekinin, bêhezkirin û
bêrehm[10] in. 32 Kesên van tiştên
ûsa dikin, hay ji fermana Xwedê

1 An jî: Tête xuyakirin.
2 Qisûr.
3 Pût.
4 Îbadet kirin.
5 Îhtirasên.
6 Ew heta bêdawiyê liyaqî pesnvedanê ye!
7 Tabiî.
8 Zilam bi zilam.
9 Ramanên bê kêr.
10 Bêmerhamet in.

ya di derheqê mirina wan de heye
dizanin, lê tenê bi çêkirina vana
namînin, lê belê kesên vana çêdi-
kin jî teswîp û tesdîq[1] dikin.

*Darazdana Xwedê ya bi dadî*

Wai 12,14; Met 7,1-5; Aqûp 4,11-12;
K.Şa 17,30-31

2 Bo vê sedemê, ya her zilamê
ku daraziyê dike, tu ne bi uzrî;
ji ber, di tiştên ku tu kesên din da-
raz dikî de, tu xwe mehkûm dikî;
ji ber ku tu, ya kesê daraziyê dikî,
tu eynî tiştî dikî! 2 Û em dizanin
ku, li dijî kesên tiştên ûsa dikin,
daraziya Xwedê li gor rastiyê ye.
3 Û ya zilamê kesên ku tiştên ûsa
dike, daraz dikî û tiştên mîna wan
dikî, tu dibêjî qey tuyê ji darazda-
na Xwedê birevî? 4 An jî ma tu bi
nezaniya qenciya Xwedê, ya ku
te dibe tobê, tu zêdeyiya qencî û
sebr û tehemûla wî kêm dibînî?
5 Lê belê ji ber inyadkirina xwe û
dilê xwe yî bê tobe bona roja xe-
zebê ku darazdana Xwedê ya dadî
bê eşkere kirin, tu xezebê ji xwe
re dicivîne; 6 dê Xwedê bersiva
kirinên her kesî bide wan! 7 Dê
jiyana bêdawî bide kesên bêsekin
qenciyê dikin û bi vî awayî li bi-
lindî, birêzî û bêmiriniyê digerin!
8 Lê belê dê xezeb û hêrsê bibarî-
ne li ser kesên xweperest û li gor
rastiyê nakin û li pey neheqiyê
diçin! 9 Pêşiyê ji kesên Cihûdan
re, him jî ji Grekan re, dê tengasî
û keserê ji her kesê xerabiyê dike
re bide 10 û dîsa pêşiyê ji Cihû-
dan re, him jî ji Grekan re, dê bi-
lindî, dilxweşî û birêzî bide her
kesên ku qenciyê dike. 11 Ji ber
ku, Xwedê di nava mirovan de
cihêtiyê nake.
12 Heçî kesên ku bi zagonê
nizanibe û gunehan bike, zagon
tune be jî dê helaq bibin. Yên bi
zanîna zagonê gunehan bike jî,
dê bi vê zagonê ve bên darazdan[2].
13 Ji ber ku kesên di qatê Xwedê de
pak bibin ne yên zagonê bihîstine,
lê yên zagonê anîne cîh in. 14 Ji
ber ku, ger neteweyên ji zagonê
ve bê hay bin, dema ku xwestekê
vê zagonê tînin cîh, zagona xwe
jî ava dikin. 15 Bi vî awayî xuya
dikin ku xwestinên zagonê, di dilê
wan de nivîsiye; ûcdanên wan jî
şahdeyiyê li vê dide; ramanên
wan jî an wan bi sûc dike, an jî
diparêze; 16 li gor Mizgîniya min,
bi navgîniya Îsa Mesîh ve roja ku
Xwedê mirovan bona sûcê wanî
dizî bide darazdanê, dê ûsa bibe.

*Zagona Pîroz û Cihûdan*

Yêr 6,19; Yû 7,19; Rom 3,20; Gal 3,10-12

17 Lê belê tu ji xwe re dibêje Cihûd
û xwe dispêre zagonê û bi Xwe-
dê ve pesnê xwe vedidî 18 û tu bi

[1] Erê.

[2] Darazkirin.

xwestina Xwedê dizanî û cihê kiri-
na qîmetên herî bilind tu ji zagonê
ve hîn bûyî 19 û tu bawer bûyî ku,
tu di zagonê de bi gîhaştina derû-
niya zanîn û rastiyê, bûyî rêberê
koran, 20 roniya kesên di tariyê de
mayî, hînkerê bêaqilan û mamos-
teyê zarokan; 21 niha, dema ku tu
hînî kesên din dikî, tu jî nikarî hîn
bibî? Dema tu nekirina diziyê waz
dikî, tuyê diziyê bikî? 22 Dema tu
dibêjî: Zinê mekin, tuyê zinê bikî?
Dema tu ji pûtan ve dikeribî, tuyê
Perestgehê talan bikî? 23 Dema tu
bi zagonê ve pesnê xwe vedidî, tu
dikarî li berya Xwedê rabe û wî
biçûk bibînî? 24 Ji ber ku ûsa ha-
tiye nivîsandin: Ji ber we[1] di nava
netewan de, kufrê ji navê Xwedê
re dikin[2].

25 Niha, ger tu bi zagonê ve bigi-
re, dê qenciya bisunetbûnê hebe;
lê belê ger tu êrîşkirê zagonê be,
bisunetbûna te bûye bêsunetbûn.
26 Bo vê yekê ger yên bêsunet, li
gor emirên zagonê bikin, ma dê
ew jî bisunet neyên hesibandin?
27 Ger tu bi xwedîbûna xwe ya
Nivîsên Pîroz û bisunetbûnê, za-
gonê dicûyî[3]; kesên bi bedenê ve
ne bisunet, lê belê yê li gor za-
gonê dike, dê te nede darazdanê?
28 Ji ber ku kesên ji derve Cihûd
be, ne Cihûd e, ne jî suneta şiklî,
ya bedenî bisunetbûn e. 29 Lê
belê kesên ji hundir ve[4] Cihûd be,
Cihûd e û ne di tîpê de, lê di Ruh
de bisunetbûna dil, bisunetbûn e;
pesnahiya wî jî ne ji mirovan e, ji
Xwedê ye.

*Dilsoziya Xwedê*

Eyû 40,8; Zeb 51,5-7; 119,75; Pey 16,7

3 Niha, çi taybetiya Cihûdan
heye? An jî qenciya bisunet-
bûnê çî ye? 2 Ji her alî ve zêde ye!
Ya yekemîn, gotinên Xwedê berê
emanetî wan bûn. 3 Ger hinekan
bawerî neanîbin[5], dê çi bibe? Ma
bêbaweriya wan, dilsoziya Xwe-
dê ji navendê radike? 4 Haşa! Her
mirov derewîn jî be, bila bê zanîn
ku Xwedê rast e; mîna ku hatiye
nivîsandin:

Da ku, tu di gotinên xwe de rast
derkeve û dema bê darazdan[6],
dozê qezenc bike[7].

5 Lê belê ger neheqiya me, dadbû-
na Xwedê derxe navendê, ma em
çi bêjin? Ez bi zimanê mirovan ve
diaxifim: Xwedayê ku bi xezebê
ceza dike, ma neheq e? 6 Haşa!
Ger ûsa be, dê Xwedê çawa da-
razdana dinê bike? 7 Lê belê ger
bi derewên min, rastiya Xwedê,
bona bilindiya wî hîn jî zêde bibe,

1 Ji rûbalê we.
2 Îşaya 52:5
3 Naynî cîh.
4 Ji dil ve.
5 Ewledar nebûn.
6 Darazkirin.
7 Zebûr 51:4

ma ez çima dîsa jî bi gunehkarî
tême darazdan? 8 Û mîna ku di
derbarê me de hatiye buxtan kirin
û mîna ku hin kes dibêjin û îdîa
dikin ku me gotiye, ma çima; em
nebêjin: Bona qencî were em xe-
rabiyê bikin? Mehkûmiyeta wan
rast e[1]!

*Qet kesên salih tune ne*

Wai 7,20; Eyû 15,14-16; 1.Mûs 6,5;
6,11-12; Zeb 14,1-3; Gal 3,22

9 Ango çi? Ma xawêniya me
heye? Na, qet nîne. Ji ber ku me
ji jor dixwaze bila Cihûd be, di-
xwaze Grek be, bi gotina; hemû
di bin gunehan de ne, sûcdar kirin.
10 Mîna ku hatiye nivîsandin:
Qet kesên salih tune ne, yek jî
tune.
11 Yê fêhm bike nîne, tu kesê ku
li Xwedê digere nîne.
12 Hemû ji rê derketin, pev re bûn
bêfêde. Yê ku qenciyê dike nîn e,
yek jî nîn e[2].
13 Devê wan gorek vekiriye; bi
zimanê xwe ve dixapînin[3];
di binê lêvên wan de jahra mara
heye[4].
14 Devê wan bi nalet û gotinên tal
ve tijî ye[5].
15 Lingên wan ber bi xwîn rijan-
dinê ve bi lez in.
16 Di rêgehên wan de xerakirin û
tengasî heye.
17 Û rêya dilxweşiyê jî nizanin[6].
18 Li ber çavên wan tirsa Xwedê
nîne[7].
19 Û em dizanin ku, hemû tiştên
ku zagon her çiqas tiştan dibêje, ji
yên di bin zagonê de ne re dibêje;
da ku, her dev bên girtin û bona
hemûya dinê li dijî Xwedê sûcdar
bibe; 20 Ji ber ku di hizûra wî de
dê tu kes ji karên zagonê salih
neyê hesibandin; ji ber ku zanîna
gunehê bi navgîniya zagonê ye.

*Rastiya bi navgîniya baweriyê*

Îşa 53,11; K.Şa 10,43; 2.Kor 5,21; Gal
2,15-16; 3,8-14; 3,22-29; Ef 2,8-9

21 Lê belê niha bi zagon û ji ali-
yê peyxamberan ve bi şehadetî
kirinê, 22 rastiya[8] Xwedê, yanê
rastiya Xwedê ya ku ji hemûyên
bi navgîniya baweriyê ji Mesîh
Îsa re baweriyê anîne re ye, ji bilî
zagonê eşkere bûye; ji ber ku qet
cihêtî nîne; 23 çimkî hemûyan gu-
nehê kirin û ji bilindahiya Xwedê
mehrûm man.
24 Ew bi navdîtiya fîdya ku di
Îsa Mesîh de ye, bi xêra wî, bê
berdêl salih têne hesibandin;
25 ji ber efûbûna gunehên ji berê
ve di sebra Xwedê de hatine ki-

[1] Hikumxwarina wan rast e!
[2] Zebûr 14:1-3
[3] Zebûr 5:9
[4] Zebûr 140:3
[5] Zebûr 10:7
[6] Îşaya 59:1.8
[7] Zebûr 36:1
[8] Pakbûn, safîkirin, an jî: Dadmendiya Xwedê.

rin, bona nîşandayîna dadiyê,
26 yanê, bona di dema niha de
dadiya wî bête nîşan dayîn[1], di
xwîna wî de bi navdîtiya bawe-
riyê, wekî kefaret be, Xwedê wî
pêşkêş kir, da ku, ew bi xwe bi
dad be û yê ku baweriyê bi Îsa
anîne salih bihesibîne.
27 Niha pesnvedan li ku ma? Li
derve ma! Lê belê bi sipartina kî-
jan qanûnê? Ma bi ya şixulan[2]?
Na, lê belê bi zagona baweriyê ve!
28 Ji ber, em di wê qenîetê de ne
ku, mirov ne bi xwestekê zagonê
anîn cîh, bi baweriyê salih têne
hesibandin. 29 An jî ma Xwedê
tenê Xwedayê Cihûdan e? Ma ne
yê neteweyên din jî ye? Belê, yê
neteweyên din e jî! 30 Ji ber ku
Xwedanê bisunetan bi baweriyê,
yên ne bêsunetan jî bi eynî bawe-
riyê salih bihesibîne yek e.
31 Niha, ma em bi navgîniya
baweriyê, zagonê betal dikin?
Haşa! Lê belê em zagonê tesdîq
dikin[3].

*Baweriya Birahîm*

1.Mûs 15,5-6; Gal 3,6-9.29

4 Niha, em ê li gor bedenê di
derheqê bapîrê xwe[4] Birahîm
de bêjin çi? 2 Ji ber ku ger Bi-
rahîm bona karên xwe yî qenc
salih hatibe hesibandin, ji pesn-
vedanê heqê wî heye; lê belê ne
li ber Xwedê. 3 Ji ber ku kitêb
dibêje çi? Û Birahîm bawerî bi
Xwedê anî û bi vî awayî pak bûyî
hate hesibandin[5]. 4 Lê belê heq-
destê ku tê dayîna xebatkaran ne
kerem e, heq tê hesibandin. 5 Lê
yê ku naşixule, lê belê bawerî bi
yê bêxwedan salih dihesibîne tîne,
baweriya yê ku bawerî aniye pak
bûyî tête hesibandin. 6 Herweha
Dawid jî, dilxweşiya zilamê ku,
Xwedê wî bêlêker salih hesiban-
diye daxuyanî dike:
7 Xwezî li kesên ku sûcên wan
hatiye efû kirin û gunehên wan
hatiye nuxumandin!
8 Xwezî li wî zilamî ku, Xudan ji
wî re guneh nahesibîne[6]!
9 Ma ev dilxweşî bona bisunetan e,
an bona bêsunetan e jî? Em dibêjin
ku: Birahîm bi saya baweriya xwe
pak bûyî hate hesibandin. 10 Ma
çawa ji wî re hate hesibandin?
dema bisunet bû, an jî dema bê-
sunet bû? Ne dema bisunet bû, lê
belê dema bêsunet bû! 11 Û gava
ew hîn bêsunet bû, bi delîliya bê-
sunetî pak bûnê, nîşana sunetê girt;
da ku, bila bibe bavê manewî yê
heçî kesên hîn bi bêsunet bûnê ba-
weriyê anîne û bila ew jî pakbûyî
bên hesibandin! 12 Û bi vî awayî
bapîrê me Birahîm, bû bavê ew

1 Xuya bibe.
2 Ma bi qaîdeya zagonê anîn cîh?
3 Erê dikin.
4 Bapîrê nîjada xwe.
5 (1:Mûsa 15:6)
6 Zebûr 32:1-2

kesên ku, tenê bisunet bûnê nema-
ne, lê belê dema ew bêsunet bû,
yên bisunet bûna xwe li pey şopa
baweriya wî dimeşin jî. 13 Ji ber
ku wada mêraskerbûnê dinê, ne bi
navgîniya zagonê, lê belê bi navgî-
niya pakbûna ku ji baweriyê tê, ji
Birahîm û nîjada wî re hate dayînê.
14 Ji ber ku ger yên girêdayiyê
zagonê mêrasker bin, bawerî vala
û wad betal e. 15 Ji ber ku zagon
xezebê pêk tîne; lê belê li cîhê ku
zagon tune be, li wê derê tecawuz
jî tune.
16 Ji ber vê yekê, bona ku li gor
xêrê[1] be, ji baweriyê ye; da ku,
wad ji hemû nîjadê re, ne tenê ji
yê ku ji zagonê ye re, mîna ku:
Min te kir bavê gellek netewe-
yan, hatiye nivîsandin[2], bila bi yê
ku ji baweriya bavê me hemûyan
Birahîm e ve jî ewle bibe; 17 ew
Birahîmê ku, li ber Xwedayê ku
miriyan divejîne û tiştên tune ne,
mîna tiştên ku hebin gazî dike,
bawerî anî.
18 Dema ew di rewşeke bêhêvî
de bû, bi hêviya ku dê bibe bavê
gellek netewan bawerî anî. Bi
soza ku: Dê nîjada te ûsa[3] bibe,
dibêje ewle bûbû[4]! 19 Û bede-
na xwe yî bi sed salî bûnê jixwe
miriye û mirîbûna rehma Sara, di
baweriyê de bi lawaz[5] neketinê
fikirî. 20 Wî bê bawerî nekir û ji
wada Xwedê şik nekir; lê belê di
baweriyê de xurt bû û Xwedê bi-
lind kir. 21 Bi hemûyan ewle bû
ku dê Xwedê bona wada xwe bîne
cîh, şiyandar[6] e. 22 Ji ber vê yekê
jî jê re pak bûyî hate hesibandin.
23 Û ya ku bo wî hate hesibandin,
ne tenê ji bo wî, 24 lê belê ji bo
yên ku dê pak bûyî bên hesiban-
din, yanê, bona me, yên bi yê ku
Xudanê me Îsa, ji mirinê vejand
bawerî anîne jî hate nivîsandin;
25 ew bona sûcên me ji mirinê re
hate dayînê û bona pakbûna me,
hate vejandinê.

*Rastiya kesê ku bawerî bi*
*Mesîh aniye*

1.Pêt 1,3-9; 1.Yû 4,9-10; Rom 8,31-39

5 Niha, em bi baweriyê ve salih
hatine hesibandin, bi navgîni-
ya Xudanê me Îsa Mesîh, bi Xwe-
dê re aştiya me heye; 2 em, bi
navgîniya wî ve jî û bi baweriyê
ve gîhaştin vê kerema ku em tê de
pêdandî ne û bi hêviya gîhaştina
bilindahiya Xwedê em pesnê xwe
didin. 3 Û tenê ne bi ewqasî, lê
belê em heta bi tengasiyan jî pes-
nê xwe didin. 4 Ji ber, em dizanin
ku tengasî hêza berxwedanê, hêza
berxwedanê ecibandinê û eciban-
din jî hêviyê ava dike 5 û hêvî jî

---

1 Qencî, kerem, înayet.
2 (1:Mûsa 17:5)
3 Yanê qasî stêrkan zêde bibe.
4 (1.Mûsa 15:5)
5 Bê teqat.
6 Bihêz e.

naşermîne; ji ber ku bi navgîni-
ya Ruhê Pîroz ku ji me re hatiye
dayîn, hezkirina Xwedê rijiyaye
dilê me.
6 Ji ber ku gava em hîn bêçare-
bûn, Mesîh di dema ku hatibû
hilbijartin de, bona bêxwedêyan
mir. 7 Ji ber ku kesekî bona mi-
rovekî salih, zor dimire, lê belê
dibe ku mirovek li dêvla yekî
qenc[1] mirinê bide ber çav[2]. 8 Lê
belê Xwedê, ji me hezkirina xwe
bi vêya îspat dike: Gava ku hîn
em gunehkar bûn, Mesîh bona me
mir. 9 Niha, li gor em bi xwîna
wî salih hatine hesibandin, hîn jî
biryar e ku em ê bi navgîniya wî,
ji xezebê xelas bibin! 10 Ji ber ku
ger em, dema neyar bûn, bi navgî-
niya mirina Lawê wî, bi Xwedê re
li hev hatibin, hîn jî biryar e ku bi
li hev hatinê, em ê bi jiyana wî xe-
las bibin! 11 Û tenê ne ewqas e, lê
belê bi navgîniya Xudanê me Îsa
Mesîh, yê ku me niha li hev aniye,
bi Xwedê re jî em pesin vedidin.

*Mirin û jiyan*

1.Kor 15,21-22; 15,45-49; 15,56-57;
Rom 6,23

12 Bo vê yekê, çawa ku guneh bi
navgîniya mirovekî û mirin jî bi
navgîniya gunehê ve ketibe dinê;
bi vî awayî mirin jî derbasî hemû
mirovan bû; ji ber ku hemûyan
guneh kirin; 13 – ji ber ku berî
zagonê[3] jî guneh di dinê de hebû;
lê belê dema zagon tune be, gu-
neh nayê hesibandin. 14 Lê belê
li gor şîb a destdirêjiya Ademê ku
wekokê kesê dê bê ye, li ser yên
ku guneh nekirine jî, ji Adem heta
Mûsa mirin serweriyê dikir. 15 Lê
belê sûc çawa be, xelat jî wusa
nîne; ji ber ku, ger bi sûcê yekî,
gellek miribin, bo gellekan bi xêra
Xwedê û zilamekî yanê bi xêra Îsa
Mesîh bexşandin hîn jî zêde bû.
16 Û bexşandin, ne mîna gunehên
bi navgîniya kesekî ye; ji ber ku
darazî bona ji sûcekê mehkûmi-
yetê; lê belê xelat, bona ji gellek
sûcan pakbûnê çêbû. 17 Ji ber ku,
ger mirin bona sûcê yekî, bi nav-
gîniya mirovekî serweriyê ajotibe,
yên ku zêdeyiya kerem û bexşa
safîbûnê girtine, bi yekî, yanê, bi
navgîniya Îsa Mesîh ve di jiyanê
de dê bi zêdeyî serweriyê bajon! –
18 Niha, çawa ku sûcek li meh-
kûmiyeta hemû mirovan re rê
vedike, kirinek rastîn jî pakbûna
jiyanê dide hemû mirovan ava
kir. 19 Ji ber, çawa ku bi sedema
bêîtaetî kirina mirovekî gellek kes
gunehkar hate kirin, bi vî awayî bi
îtaet kirina mirovekî jî gellek kes
dê bêne salih kirin.

1 Qenc.
2 Cesaret dike ku bimire.
3 An jî: Heta zagonê.

20 Û zagon, bona ku sûc zêde
bibe ket navendê; lê belê li cîhê
ku guneh zêde bûye, kerem hîn jî
zêde bûye; 21 da ku, wekî guneh
serweriya xwe bi mirinê ve dajo,
kerem jî bila bi navgîniya Xudanê
me Îsa Mesîh ve, bona dayîna ji-
yana bêdawî, bi pakbûnê[1] serwe-
riyê bajo.

*Serdestiya ku bi mirina Mesîh ve hate qezenc kirin*

Kol 2,11-13; 3,1-10;
Gal 2,19-20; 5,24; 6,14

6 Ma niha em çi bibêjin? Bona
ku kerem zêde bibe, ma em
dûmahiya gunehkirinê bikin?
2 Haşa! Em, yên ku li hember
gunehan mirîne, êdî em ê çawa
di wê de bijîn? 3 An jî ma hûn
nizanin ku, hemûyên ji me, yên
di Mesîh Îsa de vaftîz bûne, di
mirina wî de vaftîz bûne? 4 Niha,
em bi navgîniya vaftîzê ve bi wî
re, ji mirinê re hatin binax kirin;
da ku, Mesîh, çawa bi bilindiya
Bavo ji mirinê ve vejiyabe, em
jî bi vî awayî di nûbûna jiyanê
de bimeşin. 5 Ji ber ku ger em
di mirinekî mîna ya wî de, bi wî
re yek bûbin, di vejînekî mîna ya
wî de jî em ê bi wî re bibin yek.
6 Em vêya dizanin ku, êdî em ê
ji gunehê re dîlitiyê mekin, bona
ku bedena me yî gunehkar ji na-
vendê rabe, mirovê me yî kevn jî
bi wî re, hatiye xaçkirin. 7 Ji ber
ku kesekî bimire, ji gunehan ve
hatiye azad kirin.
8 Lê belê ger em bi Mesîh ve mi-
ribin, em bawer in ku em ê bi wî
re jî bijîn; 9 ji ber, em dizanin ku
Mesîh ji mirinê ve vejiyaye û êdî
namire, mirin êdî nikare serweri-
ya xwe li ser wî bajo. 10 Ji ber ku
mirina wî di berdêla gunehan de
bûye mirina pêşî û ya paşî; lê belê
jiyana ku dajo, bona Xwedê dajo.
11 Hûn jî bi vî awayî xwe li berya
gunehan mirî û di Mesîh Îsa de, li
berya Xwedê zindî bihesibînin.
12 Niha, bila guneh di bedena
we yî fanî[2] de, bona ku hûn li gor
şehwetên wê bikin, serweriyê
neajo. 13 Û endamên xwe nekin
navgîniyê neheqiyê û pêşkêşî gu-
nehê mekin; lê belê mîna kesên
ku ji mirinê vejiyaye, xwe pêşkêşî
Xwedê bikin û endamên xwe jî
bi hacetên pakbûnê ve, pêşkêşî
Xwedê bikin! 14 Ji ber ku dê gu-
neh nikaribe serweriyê li ser we
bike; ji ber ku hûn ne di bin rêve-
biriya zagonê de, lê belê di bin
keremê de ne.

*Bawermend ji rastiyê re xizmetê dikin*

Tît 2,11-14; 1.Yû 3,3-10

15 Niha çi? Ji bona ku em ne di
bin rêvebiriya zagonê de ne, lê

[1] Rastiyê.

[2] Bi mirinî de.

belê em di bin keremê de ne, ma
em gunehan bikin? Haşa! 16 Mîna
dîlên[1] îtaetê, hûn ê xwe bidin des-
tê kê, ma qey hûn nizanin ku hûn
dîlên wî kesê ku îtaetê jê re dikin
in? Hûn an dîlê gunehên dibe mi-
rinê, an jî dîlê îtaetê ku dibe rasti-
yê[2] ne. 17 Lê belê şikir ji Xwedê
re ku, mîna hûn qûlên gunehê
bûn, lê li gor sûretê hînkariya ku
hûn jê re hatine radest kirin we ji
dil îtaet kir 18 û ji gunehan hatin
azad kirin û bûn qûlên rastiyê.
19 Bona bêhêzbûna ezitiya we
ya xweza, ez li gor pîvana miro-
van diaxifim; we çawa endamên
bedenên xwe bi dîlitî pêşkêşî
bêexlaqiyê û bona xerabiyê ji xe-
rabiyê re pêşkêş kiribin, niha van
endamên xwe bona pîrozahiyê, bi
dîlitî pêşkêşî rastiyê[3] bikin. 20 Ji
ber ku hûn dema ku dîlên gunehê
bûn, ji rastiyê azad bûn. 21 Çi
berhema wê demê, ji wan tiştên
ku niha hûn ji wan şerm dikin,
ji we re hebû? Ji ber ku dawiya
wan mirin e! 22 Lê belê niha,
wekî ji gunehan bi azad kirinê û
ji Xwedê re dîl bûnê bin, bona
pîroziyê berhema we heye û da-
wiya wê jiyana bêdawî ye. 23 Ji
ber ku berdêla gunehê mirin e, lê
belê xelata Xwedê, di Xudanê me
Mesîh Îsa de jiyana bêdawî ye.

## ZAGONA RUHANÎ - ZAGONA RUHÊ JIYANÊ

*Di Zagonê de azad*

Gal 2,19-20; Rom 6,1-11

7 An ma qey hûn nizanin ku, ya
birano – ji ber ku ez ji yên za-
gonê dizanin re dibêjim – zagon,
li ser mirovekî heta ku dema dijî
serweriyê dike? 2 Ji ber, mîna
ku pîreka bi zewac, heta ku zi-
lamê wê bijî, bi zagonê ve bi wî
ve girêdayî ye; lê belê ger zilamê
wê bimire, pîrek ji zagona zilam
ve azad dibe. 3 Niha ger wusa be,
heta ku zilamê wê sax be, biçe
mêrekî din[4], jê re zinêkir tête go-
tin; lê belê ger mêrê wê bimire,
ji zagonê ve azad dibe, wusa ku,
ger bi zilamekî din re bizewice,
ne zinêkir e. 4 Ji ber vê yekê, bi-
rayên min, bona ku em ji Xwedê
re mêwe bînin; hûn jî bona yekî
din, yanê, bona gîhaştina[5] yê ji mi-
rinê vejiyaye, bi navgîniya bede-
na Mesîh, ji zagonê re mirin. 5 Ji
ber ku dema em di cîsmaniyetê de
bûn, azweriyên gunehê, yê bi nav-
gîniya zagonê ne, di endamên me
de bona ji mirinê re mêwe bîne,
dixebitî. 6 Lê belê niha, bi tiştê
ku em pê ve hatine girtin wekî em
miribin, ji zagonê ve azad bûn; da
ku, em ne di kevnariya tîpê de, lê
di nûtiya Ruh de qûlitî bikin.

1 Koleyên.
2 Pakbûnê.
3 Pakbûnê.
4 Ger bi zilamekî din re bizewice.
5 Bibin.

*Zagona Ruhanî û guneh*
Rom 5,20; 3,19-20; Gal 3,21-22

7 Wê demê em çi bibêjin? Ma qey
zagon guneh e? Haşa! Lê belê nav-
gîniya zagonê tunebûya, min ê bi
gunehê ve nizanîba; ji ber ku ger
zagonê negotiba: Çavbirçî mebe[1],
min ê nizanîba çavbirçîtî çî ye.
8 Lê belê guneh bi dîtina fersendê,
bi navgîniya emrê, di min de bi her
avayî çavnebarî ava kir; ji ber heta
ku zagon tune be, guneh mirî ye.
9 Û gava ku hîn zagon tunebû, ez
zindî bûm; lê belê dema ku emir
hat, guneh vejiya û ez mirim. 10 Û
emirê ku bona jîyanê bû, ji min re
bû bona mirinê. 11 Ji ber ku guneh,
bi navgîniya emir fersendê dît, fe-
nekiyê li min kir û bi navgîniya wê
min kuşt. 12 Ûsa ku, zagon pîroz e
û emir pîroz û rast û qenc e.
13 Ma niha, qey ya qenc ji min
re bû mirin? Haşa! Lê belê da ku,
bona guneh bi gunehî bê nas ki-
rin, bi navgîniya ya qenc mirinê
ji min re dianî; da ku, bona bi
navgîniya emrê bila baş bê fêhm
kirin ku guneh heta dereca dawîn
bi gunehî ye.

*Zagona Ruhanî guneh eşkere dike*
Gal 5,16-25; Rom 8,1-9

14 Ji ber, em dizanin ku, zagon
ruhanî ye; lê belê ez bedenî me,
mîna dîlekî di gunehê de hatime
firotin. 15 Ji ber ku ez bi kirina
xwe nizanim; nikarim tiştê ku
dixwazim bikar bînim, lê belê
tiştê ku jê dikerihim, dikim.
16 Lê belê ger ez tiştê ku
naxwazim bikim, ez ê bi gotina
zagon qenc e, bipejirînim[2].
17 Wê gavê vêya êdî ne ez, gunehê
ku di min de dimîne çêdike. 18 Ji
ber, ez dizanim ku, tiştekî qenc
di min de, yanê, di ezitiya minî
xweza de nîne; ji ber ku di min de
bona çêkirina tiştekî qenc xwestin
heye, lê belê hêz tune ye. 19 Ji
ber ku tiştê qenc yê ez dixwazim
çêbikim, nakim, lê belê tiştê
xerab yê ku ez naxwazim çêkim,
dikim. 20 Lê belê ger ez, tiştên
ku naxwazim dikim bim, êdî ne
ez, lê belê gunehê ku di min de
dimîne wê dike.
21 Ger wusa be, ez ê vê zagonê
bibînim; dema ku ez dixwazim
tiştên qenc bikim, ji bona min
xerabî amade ye. 22 Ji ber ku ji
hebûna xwe yî hundirîn ve zew-
qê[3] ji zagona Xwedê ve digirim;
23 lê belê di endamên xwe de
zagonekî din[4] dibînim ku, li dijî
zagona aqilê min şer dike û min
dike bindestê zagona ku di en-
damên bedena min de ye. 24 Ez
çi mirovekî belengaz[5] im! Ma kî

[1] (2.Mûsa 20:17; 5.Mûsa 5:21)
[2] Tesdîq bikim.
[3] Dilxweşiyê.
[4] Zagonekî cihê.
[5] Reben im.

yê min ji vê bedena ku dibe mi-
rinê xelas bike? 25 Ez bi navgî-
niya Xudanê me Îsa Mesîh ve, ji
Xwedê re şikir dikim! Niha, bi vî
awayî ez bi aqilê xwe ji zagona
Xwedê re, lê belê bi bedenê ji za-
gona gunehê re qûlitî dikim.

*Ruhê ku jiyanê dide*

Gal 3,13-14; Rom 6,22-23; Gal 5,16-25; 6,8

8 Bi vî awayî, niha ji kesên di
Mesîh Îsa de ne re, êdî qet meh-
kûmiyetek nîne. 2 Ji ber, zagona
Ruhê ku jiyanê dide, di Mesîh Îsa
de, min ji zagona guneh û mirinê ve
azad kir. 3 Ji ber ku Xwedê Lawê
xwe di dirûvê bedena gunehê de
û bona gunehê şand û gunehê di
bedenê de mehkûm kir û tiştê ku
zagon, bona ku ji ber bedenê lawaz
e nikare bike, kir[1]; 4 da ku, xwes-
tina zagonê ne li gor bedenê, di me
de, di yên li gor Ruh ve dijîn de
were cîh.
5 Ji ber, yên ku li gor bedenê ne
tiştên bedenê, lê belê yên ku li
gor Ruh in tiştên Ruh difikirin.
6 Ji ber ku ramanê li gor bedenê
mirin e, lê belê ramanê li gor Ruh
e jî jiyan û dilxweşî ye. 7 Ji ber
ku ramanê li gor bedenê, neyar-
tiya li dijî Xwedê ye; ji ber ku ji
zagona Xwedê re îtaet nake, him
jî nikare bike 8 û kesên di bedenê
de ne, nikarin Xwedê xoşnûd
bikin. 9 Çi heye ku, ger Ruhê
Xwedê di we de bijî, hûn ne di
bedenê de, lê belê di Ruh de ne.
Lê belê di kesekî de Ruhê Mesîh
tune be, ew kes ne yê Mesîh e.
10 Û ger Mesîh di we de be, be-
den ji ber gunehan mirî ye, lê belê
ruh ji ber pakbûnê[2] jîyan e. 11 Lê
belê ger Ruhê yê ku Îsa ji mirinê
vejandiye di we de bimîne, yê ku
Mesîh Îsa ji mirinê vejandiye, bi
navgîniya Ruhê xwe yî di we de
dimîne, dê bedenê we yî bi mirin
bivejîne.
12 Niha ger wusa be, ya birano, em
li gor ji bo bedenê bijîn, ne deyndarê
bedenê ne! 13 Ji ber ku ger hûn li
gor bedenê bijîn, hûn ê bimirin, lê
belê ger hûn karên bedenê bi Ruh
ve bikujin, hûn ê bijîn. 14 Ji ber ku
hemû kesên ku bi Ruhê Xwedê ve
tên îdare kirin, lawên Xwedê ne.
15 Ji ber ku we, dîsa ji bo tirsê ruhê
dîlitiyê negirtin, lê belê we ruhê la-
witiyê girtin û em bi wî ve: Abba,
Bavo! bang dikin. 16 Ruh bi xwe,
bi ruhê me ve, şahdeyiyê dike ku
em zarokên Xwedê ne. 17 Û ger
em zarok in, him jî em mêrasker
in; mêraskerê Xwedê û bi şirîkantî
mêraskerê Mesîh in; ger em pevre
êşê dikişînin, bona pevre jî bilind-
bûna me ye.

---

1 An jî: Ji ber ku ezitiya mirovan ya xweza, tiştên ku zagon ya bêhêz nikarîbû bikira, Xwedê ew tişt kir. Lawê xwe yî heq di mîna mirovan de bi qurbanî şand gunehan û gunehan di ezitiya mirov de da daraz dan.

2 Rastiyê.

*Hêviya hatinekî bi rewnaqî*

1.Yû 3,1-3; 2.Kor 4,16-18; 2.Pêt 3,13

18 Lewma ez dihesibînim ku,
keserên dema niha, ji bo me, ne
tiştekî li gor mezinahiya ku em kişf
bikine ne. 19 Ji ber ku afirandin, bi
bêrîkirina mezin li benda derketina
lawên Xwedê ya navendê ye. 20 Ji
ber ku afira ne bi daxwaza xwe,
lê belê ji ber sedema yê ku beşdar
dike, hate beşdarî kirinî netêwê[1].
21 Bi vê hêviya dê afirandin jî, ji
dîlitiya xerabûyî xelas bibe û bi-
gihêje azadiya bilind ya zarokên
Xwedê. 22 Ji ber, em dizanin ku
heta niha hemû afirandin dinale û
jana welidandinê dikişîne. 23 Û
tenê ne ev, lê belê em bi xwe jî,
yên xwediyê nûberê Ruh jî bi bêrî
kirinê li benda girtina lawitiyê,
yanê, xelaskirina bedenê xwe ne
û di hundirê xwe de dinalin. 24 Ji
ber ku em bi hêviyê ve xelas bûn;
lê belê hêviya ku xuya dibe, ne
hêvî ye; ji ber, ma kî dikare tiştê
ku dibîne hêvî bike? 25 Lê belê
ger me hêviya xwe li ya hîn me
nedîtiye girê dabe, em ê bi sebir li
benda wê bin.

*Ji serketiyan jî jortir*

Ef 1,3-12; Rom 5,1-11; Yû 10,27-30

26 Û bi vî awayî, Ruh jî di
bêhêzbûna me de alîkariyê bi me
re dike; ji ber, em nizanin ku ka
em ê çawa dua bikin, lê belê Ruh
bi xwe bi axînên nayên gotinê ve
ji bona me şefaetê dike. 27 Û yê
ku lêkolînan li dil dike, dizane ku
fikrê Ruh çî ye; ji ber ku ew li gor
xwestina Xwedê, bona pîrozan
şefaetê dike. 28 Û em dizanin ku
hemû tişt, bi hev re, bona kesên
ku ji Xwedê hez dikin, bona kesên
ku li gor mirazê xwe hatine bang
kirin re, bona qenciyê dişuxulin.
29 Ji ber ku wî, kesên ji berê
ve zanîbû, bona wergerîne mînakê
Lawê xwe, ji berê ve hilbijartî
ye; da ku, bila ew di nava gellek
birayan de bibe yê pêşîn welidiye.
30 Û wî, bangî kesên ku ji berê ve
hilbijartiye kir û kesên ku bangî
wan kiribû salih jî hesiband û
kesên ku salih hesibandibû bilind
jî kir.
31 Niha, em ji vêya re bibêjin çi?
Ger Xwedê li aliyê me be, kî dikare
li dijî me be? 32 Yê ku Lawê xwe
ne parêst, lê belê wî di oxra me
hemûyan de da mirinê, ma ew dê
tevî wî jî, hemû tiştan çawa ji me
re nebexşîne? 33 Dê kî li dijî kesên
ku Xwedê hilbijartiye gilî bike? Yê
ku wan mafdar derdixe[2] Xwedê ye;
34 ma yê ku sûcdar bike, kî ye?
Yê ku miriye û hîn zêde, veji-
yaye Mesîh Îsa ye ku, li aliyê rastê
Xwedê ye û bona me şefaetê dike!
35 Ma kî dikare me ji hezkirina

[1] Betal.

[2] Heqdar derdixe, pak dike.

Mesîh ve veqetîne[1]? Qey tengasî,
an keser, an zilm, an birçîbûn,
an tazîbûn, an xeterî, an jî şûr?
36 Mîna ku hatiye nivîsandin:
Em di oxra te de hemûya rojê tên
kuştin, em mîna mîhên qesabî[2]
hatine hesibandin!
37 Lê belê em bi navgîniya yê ku ji
me hez dike, di vana hemûyan de ji
kesê serketine jî jortir in. 38 Ji ber,
ez bawer im ku, ne mirin, ne jiyan,
ne milyaketan, ne rêvebiriyan, ne
tiştên dema niha, ne jî tiştên dema
ku bê, ne qudretan, 39 ne bilindahî,
ne kûritî, ne jî tiştekî dinî hatiye
afirandin, nikare ku me ji hezkirina
Xwedê ya di Xudanê me Mesîh Îsa
de ye veqetîne.

*Yên ku Xwedê wan hilbijartiye*

Gal 4,22-31; 1.Mûs 25,21-26; Îbr 11,8-9

9 Ez di Mesîh de rastiyê dibêjim,
derewan nabêjim; ûcdanê min
di Ruhê Pîroz de ji min re şahdeyiyê
dike; 2 di dilê min de keserek me-
zin, êşek bi dûmahî heye. 3 Ji ber
ku birayên min, min dixwest ku ez
di oxra merivê xwe yî li gor bedenê
de ji Mesîh ve bême qewirandin;
4 ew Îsraêlî ne, lawitî û bilindahî
û pêyman[3] û dayîna zagon û pe-
ristinê û wad yên wan in; 5 kalik
yên wan in û li gor bedenê Mesîh
ji wan e; ew li ser hemûyan abadîn
Xwedayê pîroz e! Amîn.
6 Lê belê ev nabe ku gotina Xwe-
dê vala derketiye. Ji ber ku yên ji
Îsraêl in, hemû ne Îsraêl in. 7 Ji ber
ku ji nîjada Birahîm jî bin, hemû
ne zarok in. Lê belê bi avahiya:
Dê nîjada te bi Îshaq ve bidome[4],
hatiye nivîsandin. 8 Yanê, zarokên
bedenê, ne zarokên Xwedê ne; lê
belê zarokên wadê, nifşe têne he-
sibandin. 9 Ji ber ku gotina wadê
ev e: Ez ê di vê demsalê de werim
û dê lawekî Sara çê bibe[5].
10 Û tenê ne ev, lê belê dema
Rebeka jî ji yekî, ji bapîrê me Îs-
haq ve bi ducanî mabû; 11 ji ber,
berî ku hîn zarok bûbûn[6] û tiştên
qenc an jî xerab bikin, 12 ji Re-
beka re hate gotin: Dê yê mezin,
qûlitiyê ji yê biçûk re bike[7]. Ûsa
ku, armanca Xwedê ku di kirina
vê hilbijartinê de ne li gor karan,
lê belê bila li gor banga wî bido-
me; 13 mîna ku hatiye nivîsandin:
Ji Aqûp hez kirim, lê belê ji Esav
kerihîm[8].

*Armanca Xwedê*

Îşa 45,5-12; Yêr 18,1-6; Eyû 40,1-14; 41.3

14 Niha, em bibêjin çi? Ma
Xwedê bêdadiyê dike? Haşa!
15 Ji ber ku ji Mûsa re dibêje:

1 Dûr bixîne.
2 Mîhên jêkirinê, Zebûr 44:22
3 Ahîd.
4 (1.Mûsa 21:12)
5 (1.Mûsa 18:10)
6 Biwelidin.
7 (1.Mûsa 25:23)
8 Maleyaxî 1:2-3

Ez ê li yê ku dilovaniyê kirime re
dilovaniyê bikim û yê ku ez li ber
ketime, ez ê li ber bikevim[1].
16 Niha, ger wusa be, ne ji yê ku
dixwaze, ne ji yê ku baz dide, lê
belê ji Xwedayê dilovan e. 17 Ji
ber ku Nivîsa Pîroz ji Fîrawûn re
dibêje:
A vay, bona ku qudreta xwe di te
de xuya bikim û navê xwe li hemû
rûyê erdê bidim bihîstin,
min te bilind kir[2].
18 Niha, bi vî awayî, ew dikare
ji kî re bixwaze, dilovanî bike û
ji kî re bixwaze, dikare dilê wî
tund[3] bike.
19 Niha, tuyê ji min re bibêje: Wê
çaxê ew çima hîn mirovan bisûc
dibîne? Ji ber ku ma kî dikare li
ber xwesteka wî bisekine? 20 Na,
lê belê ya mirov, ma tu kî ye ku,
tu bersivê dide Xwedê? Yê ku
şikil hatiye dayîn, ji yê ku şikil
dayiye re qet dibêje: Te çima min
wusa kir? 21 An jî qey rayedariya
kûzger[4] tune ye ku, ji heriya wek-
hev qabekî bona karekî birûmet û
qabekî jî bona karekî bêrûmet çê
bike? 22 Ger Xwedê bi xwesti-
na xwe yî xezeba xwe xuya bike
û hêza xwe bide nasîn, bi kesên
dê bibe nîşana xezeba wî û helaq
bibin, bi sebrekî mezin baldirêjî[5]
kiribe 23 û ji kesên bona bilindki-
rinê ji berê ve amadeyî û dilovanî
kiriye re, bona têgihandina dewle-
mendiya bilindiya xwe vêya kiri-
be, em çi bêjin? 24 Ev mirovên ku
tenê ne ji Cihûdan, ji neteweyên
din jî bangî wan kiriye em in.
25 Mîna ku ew di pirtûka Hoşeya
de jî dibêje:
Ez ê ji yê ne gelê min e re bibêjim
gelê min, ji yê ne xoşewîst e re jî
xoşewîst bibêjim[6].
26 Û dê wusa bibe ku, yên li wî
cîhê ku ji wan re hatiye gotin:
Hûn ne gelê min in, li wê derê bi
navê lawên Xwedayê zindî bên
nav kirin[7].
27 Û Îşaya di derheqê Îsraêl de bi
vî awayî diqêre:
Hejmara lawên Îsraêl qasî qûma
behrê zêde be jî, tenê dê bermayi-
ya wan[8] xelas bibe.
28 Ji ber ku Xudan dê karên da-
razdana li rûyê erdê zû çêke û bi-
qedîne[9]!
29 Û mîna ku Îşaya ji berê ve
gotiye:
Ger Xudanê artêşan nîjadek ji me
bajo ne parastiba, em ê mîna So-
dom bibûna û wekhevê Gomora
bibûna[10]!

---

1 (2.Mûsa 33:19)
2 (2.Mûsa 9:16)
3 Hişk.
4 Şerbikger.
5 Tehemûl, sebir.
6 Hoşeya 2:23
7 Hoşeya 1:10
8 Ji nava wan hindik kes, yên jibermayî.
9 Îşaya 10:22-23
10 Îşaya 1:9

*Bêbaweriya Îsraêlê*

Rom 3,21-31; Gal 2,15-16.21; 3,1-14

30 Niha, em bibêjin çi? Neteweyên
ku ne li pey pakbûnê diçûn, gîhaştin
pakbûnê, pakbûna ji baweriyê ve
tê; 31 lê belê Îsraêla ku li pey zago-
nekî pakbûnê tîne çû, negîhaşt wê
zagonê. 32 Çima? Ji ber ku mîna ne
bi baweriyê, lê belê bi karên qenc
ve dibe, bona pakbûnê şuxulîn û di
kevirê xijiyê de pelitîn; 33 mîna ku
hatiye nivîsandin:
A vay, ez li Siyonê kevirekî xi-
jiyê û latekê tilpekiyê datînim û
yên ku baweriyê bi wî bînin, dê
neşermin[1]!

10 Ya birano! Xwesteka dilê min
û bergera min a di derheqê Îs-
raêlê de ji Xwedê re, bona xelasiya
wan e. 2 Ji ber ku ez şahdeyiyê li
wan dikim ku, bona Xwedê xîreta
wan heye, lê belê ne li gor zanyari-
yê ye. 3 Ji ber ku wan, bi nezaniya
rastiya Xwedê[2], bona pêdandî dayî-
na ya xwe xebitîn û bengî rastiya
Xwedê nebûn. 4 Ji ber ku bona
her kesê ku bawerî aniye pak bibe,
Mesîh dawiya zagonê ye.

*Xelasiya ku bona her kesî ye*

5 Ji ber ku Mûsa, di derheqê pak-
bûna[3] ku ji zagonê ve tê de vana
nivîsandiye: Mirovê ku van tiştan
bîne cîh, dê bi navgîniya vana ve
bijî[4].
6 Lê belê pakbûna ku ji baweriyê
ve tê ûsa dibêje: Di dilê xwe de:
Dê kî here ezman[5]? – yanê bona
daxistina Mesîh – 7 an jî: Dê kî
dakeve warê miriyan – yanê bona
ku Mesîh ji miriyan ve derxîne?
– nebêje. 8 Lê belê çi dibêje?
Gotin nêzîkî te ye, di dev û dilê
te de ye[6]!
A vay, gotina baweriyê ku em di-
din bihîstin ev e. 9 Ji ber ku ger tu
bi devê xwe bi eşkeretî bibêjî Îsa
Xudan e û ji dilê xwe baweriyê bînî
ku Xwedê wî ji mirinê vejandiye,
tuyê xelas bibî. 10 Ji ber ku mirov
bi bawerkirina ji dil ve pak dibe û
baweriya xwe bi devê xwe eşkere
bêje jî xelas dibe. 11 Ji ber ku Ni-
vîsa Pîroz dibêje: Tu kesê bi wî re
bawerî aniye, dê neyê şermezarî ki-
rin[7]! 12 Ji ber ku cihêbûna Cihûd,
an jî Grek nîne; ji ber ku eynî Xu-
dan, yê hemûyan e; ji hemûyên li
ber wî digerin re dewlemend e;
13 ji ber: Her kesê ku bangî navê
Xudan bike, dê xelas bibe[8].

*Sedema Bêbaweriya Cihûdan*

14 Lê belê dê çawa bangî kesê ku
bawerî pê neanîne bikin? Ji kesê

1 Dê neyên şermezarî kirin. Îşaya 28:16
2 Pakbûn, an jî: Dadiya Xwedê.
3 Rastiya.
4 Dê pê re bijî, (3.Mûsa 18:5)
5 (5.Mûsa 30:12-13)
6 (5.Mûsa 30:11)
7 Îşaya 28:16
8 Yowêl 2:32

ku nebihîstine re, dê çawa bawer
bikin? Ger yê ku waz bike tune
be, dê çawa bibihîzin? 15 Û ger
neyên şandin, dê çawa wazê bi-
din[1]? Mîna ku hatiye nivîsandin:
Lingên kesên ku mizgîniya tiştên
qenc didin, çi xweşik in[2]!
16 Lê belê hemûyan guhdari-
ya Mizgîniyê nekirin. Ji ber ku
Îşaya dibêje: Ya Xudan, ma kî
bi nûçeya ku me da bawer bû[3]?
17 Ûsa tê ku, bawerî bi bihîstina
gotinê û bihîstin bi navgîniya go-
tina Xwedê ve dibe[4]. 18 Lê belê
ez dipirsim: Ma qey wan nebihîs-
tin? Belê, bihîstin!
Dengê wan gîhaşt hemûya rûyê
erdê û gotinên wan jî gîhaştin çar
hawirdorê erdê[5].
19 Lê belê ez dipirsim: Ma Îs-
raêl fêhm nekir? Pêşiyê Mûsa
dibêje:
Ez ê we bi yên netew nebûne
ve çavnebar bikim û bi netewek
fêhmneker ve jî we hêrs bikim[6].
20 Û Îşaya bi cesaret dibêje: Yên
li min nedigeriyan min dîtin,
min xwe nîşanî kesên ku min ne-
dipirsîn da[7].
21 Lê belê ew di derheqê Îsraêlê
de dibêje:

Min di hemûya rojê de, destê
xwe, dirêjî gelekî bêîtaetiyê dike
û li dijî disekine, kir[8]!

*Xwedê gelê xwe red nekir*

5.Mûs 30,1-14; Îşa 10,20-22; 30,18-26;
Mîk 4,1-8

11 Niha ez dipirsim: Ma Xwedê
gelê xwe red kir? Haşa! Ji ber
ku ez jî Îsraêliyek ji nîjada Birahîm
û ji eşîra Benyamîn im. 2 Xwedê
ji gelê xwe yî ji berê ve zanîbû rû
nezivirand. Ya na hûn Nivîsa Pîroz,
di birra derheqê Êlyas de çi dibêje
û giliyê ku ew li dijî Îsraêlê li Xwe-
dê dike, qey nizanin? 3 Ya Xudan,
peyxamberên te kuştin, pêşkêşge-
hên te xera kirin û tenê ez mam û
bona kuştina min dişuxulin[9]!
4 Lê belê bersiva ku Xwedê da wî çi
dibêje? Min heft hezar kesê li ber-
ya Baal çong neşikandine ji xwe re
cihê kir[10]. 5 Mîna vêya di dema niha
de jî, civakekî biçûk ya ji keremê ve
hatiye bijartin heye. 6 Lê belê ger
ev bi keremê bûbe, êdî ne ji karan
e; ya na dê kerem êdî ne kerem be!
7 Dawî çi ye? Îsraêl, negîhişt tiştê ku
lê digeriya, lê belê yên hatine bijartin
gîhaştin û yên din hatin tund[11] kirin;
8 mîna ku hatiye nivîsandin:

---

1 Çawa waaz bikin?
2 Îşaya 52:7
3 Îşaya 53:1
4 ...bi belavbûna gotina di derheqê Mesîh de dibe.
5 Nîçikên erdê. Zebûr 19:4
6 We biqehrînim. (5.Mûsa 32:21)
7 Îşaya 65:1
8 Îşaya 65:2
9 Û li canê min digerin. (1.Qiralan 19:10)
10 (1.Qiralan 19:18)
11 Hişk.

Xwedê ruhê xewariyê da wan;
heta roja îro çavên ku nabînin û
guhên ku nabihîzin da wan[1].
9 Û Dawid dibêje:
Bila sifra wan li wan bibe kemîn û
qapan û tilpekî û ceza.
10 Bila çavên wan bona nedîtinê
tarî bibe û pişta wan her dem xwar
bike[2]!
11 Niha ez dipirsim: Ma ew bona
xerabûnê lewitîn? Haşa! Lê belê
bona behecandina wan, ji ber
sûcên wan, xelasî ji netewan re
hat. 12 Û ger sûcê wan bûbe dew-
lemendiya dinê û xerabûna wan
bûbe dewlemendiya netewan, dê
temambûna wan hîn çiqas zêde
dê bibe dewlemendî!

*Şîret û îkaz*

1.Kor 4,7

13 Lê belê ji we re, ji yên netewe-
yan re dibêjim: Ji ber ku ez bûme
şagirtê neteweyan, ez wezîfeya xwe
bilind dihesibînim; 14 bi vî awayî
dibe ku ez kesên ji netewa xwe bi-
behicînim û ji wan hinekan xelas
bikim. 15 Ji ber ku, ger redbûna
wan li hev hatina dinê ava kiribe,
qebûl kirina wan, ji mirinê derbasî
jiyanê bûn nebe, gelo çî ye? 16 Û
ger pariyê pêşîn pîroz be, hevîr jî û
ger kok pîroz be, gulî jî pîroz in.
17 Lê belê ger hinek gulî hatibin
jêkirin û tu, mîna darê zeytûnê ya
bejî, hatibe lûl kirin û bûbe şirîkê
koka darê zeytûnê, ya qelew, li
dijî guliyan pesnê xwe nede!
18 Lê belê ger tu pesnê xwe dide,
(ji bîr meke ku) tu rehê nakişîne,
reh te dikeşîne! 19 Niha, tuyê
bibêjî: Bona ku ez lûl bibim
guliyan jêkirin. 20 Rast e! Ew ji
bêbaweriya xwe hatin jêkirin û
tu jî bi baweriya xwe li cîhê xwe
sekiniye. Quretiyê meke, lê bitirse!
21 Ji ber ku ger Xwedê guliyên esil
neparastiye, dê te jî neparêze.
22 Niha, li qencî û tundiya Xwedê
binihêre; ew, li dijî kesên ketî tund
e; lê belê ger tu di qenciya wî de
bimîne, dê li dijî te qenc bibe; ya
na tuyê jî bête jêkirin! 23 Û ger ew
jî di bêbawerbûnê de nedomînin,
dê lûl bibin; ji ber, hêza Xwedê
heye ku wan dîsa lûl bike. 24 Ji
ber ku ger tu, ji darê zeytûnê ya
bejî ya di xwezaya xwe de bête
jêkirin li dijî xwezaya xwe, li
darekî zeytûnê ya qenc ve hatibe
lûl kirin, ew ku, guliyên xweza
ne, dê çiqas bi zêdeyî li darê xwe
yî zeytûnê ve bêne lûl kirin!

*Dê hemûya Îsraêlê xelas bibe*

Yêr 31,31-40; Hêz 36,23-36; Hoş 3,4-5;
Îşa 54,7-10

25 Ji ber ku, ya birano, bona ku hûn
bi xwe û xwe nebin zana, heta ku
hemûya neteweyan beşdar bibin,

1 (5.Mûsa 29:4)
2 Zebûr 69:22-23

ez naxwazim raza ku, bi qismî ji
Îsraêlê re tundî bûye, ji we ve ne-
nas bimîne. 26 Û bi vî awayî, dê
hemûya Îsraêlê xelas bibe; mîna
ku hatiye nivîsandin:
Dê Xelasker ji Siyonê bê û bêxwe-
dayiyê ji Aqûp ve bi dûr bixe[1].
27 Û dema ku ez gunehên wan
rakim; peymana ku ez bi wan re
bikim ev e[2].
28 Her çiqas ew li gor Mizgîniyê
di oxra we de bûn dijmin, lê belê
li gor bijartinê, di oxra kalikan de
xoşewîst in[3]. 29 Ji ber ku bang û
xelatên Xwedê paş ve nayên gir-
tin[4]. 30 Ji ber çawa ku demekê we
ji Xwedê re bawerî nedikirin[5], lê
belê niha ji ber bi bêbaweriya wan[6]
hûn gîhaştin dilovaniyê; 31 mîna
vêya, niha vana jî bûn bêîtaetker,
da ku, bi dilovaniya ku ji we re
hatiye nîşan dayîn ew jî niha bi-
gihêjin dilovaniyê. 32 Ji ber, bona
ku Xwedê ji hemûyan re dilovani-
yê bike, hemûyan di nav bêîtaetîki-
rinê de girt.
33 Ya kûritiya zanyarî û zanîn û
dewlemendiya Xwedê! Daraziyên
wî çiqas ku aqil nagihêje û rêyên
wî çiqas nayên fêhm kirinê!
34 Ji ber ku ma kî bi ramanên Xu-
dan zanî?
An jî kî bû şîretkirê wî?
35 An jî kî tiştekî berê da wî ku û
dîsa berdêlê jê re bê dayîn?
36 Ji ber ku hemû tişt ji wî û bi
navgîniya wî û bona wî ne. Bila
bilindahî heta bêdawiyê ji wî re
be! Amîn.

*Qurbanên zindî*

Rom 6,13; 1.Kor 6,19-20; 1.Pêt 4,2

12 Niha ya birano, ez bona di-
lovaniya Xwedê li ber we
digerim ku hûn bedenên xwe mîna
qurbanên zindî, pîrozî û wî xoşnûd
kirî pêşkêşî Xwedê bikin; peristina
we yî ruhanî ev e! 2 Û li gor vê
alemê mekin; lê belê bona ku hûn
bizanibin viyana[7] Xwedê, ya qenc,
xweş û bêkêmasî çi ye, bi nûbûna
ramanên xwe ve bêne guhertin.
3 Ji ber, ez bi wê xêr[8] a ku ji min
re hatiye bexşandin ji her zilamê
ku di nav we de ye re dibêjim, bila
kes di derheqê xwe de ji hewceki-
rina fikirandinê zêdetir nefikire; lê
belê her kes, bila li gor pîvana ba-
weriya ku Xwedê dayiyê, bi eqlî
selîm bifikire. 4 Ji ber, mîna ku di
bedenekê de gellek endamên me
hene û karên hemû endaman ne
wekhev e, 5 em jî, yên ku gellek
in, di Mesîh de yek beden in û en-
damên hev in. 6 Û li gor xêra ku
ji me re hatiye bexşandin, xelatên

---

[1] An jî: Vegerîne. Îşaya 59:20-21
[2] Îşaya 27:9
[3] Evînî ne, tên hez kirin.
[4] An jî: Nayên vegerîn.
[5] An jî: Îtaet nedikir.
[6] Îsraêliyan.
[7] Daxwaz.
[8] Kerem.

me yî ruhanî yên cihê hene; ger
peyxamberî be, bila li gor pîvana
baweriya xwe; 7 ger xizmet be;
bila di xizmetê de; ger yekî hînker
be, bila di hînkirinê de be; 8 an jî
ger şîretker be, bila şîretan bide;
yê ku bexşê dike, bila bi comerdî;
yê ku rêvebirtî dike, bila bi xîretê;
yê ku dilovaniyê dike, bila bi rû-
kenî bike!

*Hezkirin*

1.Pêt 3,8-12; Îbr 13,1-3.16

9 Bila hezkirina we, ne bi durûyî
be! Ji xerabiyê bikerihin; bi qenci-
yê ve xwe girêdin! 10 Di hezkirina
biratiyê de ji hev û din bi dilovanî
hez bikin; di hurmetê de yên din
çêtir bibînin! 11 Di xîretê de sist
nebin; di Ruh de agirîn bibin; qûli-
tiyê ji Xudan re bikin! 12 Bi hê-
viyê kêfxweş bibin; di tengasiyê
de di ber xwe bidin; di duê de bi
xîret bidomînin! 13 Beşdarî mota-
jiya pîrozan bikin; bala xwe bidin
mêvan perweriyê! 14 Bona kesê
zilmê li we dikin, qenciyê bixwa-
zin; qenciyê bixwazin û lanetê me-
kin! 15 Bi kêfxweşan re kêfxweş
bibin; bi kesên digirîn re bigirîn!
16 Li dijî hev û din yekraman bin.
Tiştên bilind nefikirin, lê belê he-
valtiyê bi kesên biçûk tên dîtin
re bikin. Ji cem xwe zane nebin!
17 Li dijî xerabiyê ji tu kesî re
xerabiyê mekin! Li ber çavên her
kesî, bona çêkirina ya qenc, bala
xwe bidin. 18 Ger bibe, heta ku ji
destê we tê, bi hemû mirovan re di
nava aşitiyê de bijîn.
19 Ya xoşewîstno, ji bo xwe tolê
nestînin; lê belê cîh bidin xezeba
Xwedê; ji ber ku hatiye nivîsan-
din: Xudan dibêje: Tol ya min e, ez
ê berdêla wê bidim[1]. 20 Lê belê:
Ger neyarê te birçî bûbe, wî têr
bike; ger tî bûbe, avê bide wî.
Ji ber ku bi çêkirina vana, tuyê
pêtên agir li ser serê wî kom bikî[2].
21 Nebe binketê xerabiyê, lê belê
xerabiyê bi xenciyê bindest bike!

*Bengî rêvebiriyan bibin*

1.Pêt 2,13-17; M.Sil 24,21-22

13 Bila her kes, bengî rêvebi-
riya ku li ser xwe ye bibe;
ji ber ku rêvebirtiya ne ji aliyê
Xwedê be nîne û yên ku hene, ji
aliyê Xwedê ve hatine sazûman
kirin. 2 Ji ber vê yekê, yên ku li
dijî rêvebiriyê di berxwe bide,
dibe ku li dijî ya Xwedê sazûman
kiriye di berxwe bide û yên ku li
dijî wê rabin, dê bên daraz kirin.
3 Ji ber ku divê ne kesê ku qenciyê
dikin, lê belê yê ku xerabiyê dikin
ji rêvebirên xwe bitirsin. Û ma tu
dixwazî ji rêvebiriyê ve netirsî?
Yê qenc bike û tuyê pesnvedana
wê qezenc bike. 4 Ji ber ku ew,

1 (5.Mûsa 32:35)

2 M. Silêman 25:21-22

bona qenciya te di xizmeta Xwe-
dê de ye. Lê belê ger tu yê xerab
bikî, bitirse! Ji ber ku wî şûr bona
bêfêdeyî li xwe bar nekiriye; ji
ber ku ew xizmetkarê Xwedê ye,
bona xezeba ji xerabiyê kirinan re
tolhildankar e. 5 Bo vê yekê, tenê
ne bona xezebê, lê belê divê bona
ûcdanê jî mirov bengî wê bibe.
6 Ji ber ku sedema bacdana[1] we
jî ev e. Ji ber ku ew, xizmetkarên
Xwedê yên bona vê armancê bi
xîret dişuxulin in. 7 Yê heqê wî
li bacê heye bacê, yên heqê wî li
bacgehê heye bacgehê, yên heqê
wî li tirsê heye tirsê, yên heqê wî
li birêziyê heye birêziyê, heqê her
kesî bidinê.

*Ji hev û din hez bikin*

8 Xeynî ji hev û din hezkirinê pê
ve, qet nebin deyndarê kesekî; ji
ber ku yên ji kesên din hez dike,
zagonê aniye cîh. 9 Ji ber ku
emirên: Zinê meke, mirov mekuje,
diziyê meke, şahdeyiya derewîn
meke; çav bernede malê kesekî
din[2] û xeynî wê çi emir hebe, ew
jî di vê gotinê de bi kurtayî tê
zimên: Ji cîranê xwe, mîna xwe
hez bike! 10 Hezkirin, xerabiyê bi
cîranan ve nake; bo vê yekê hezki-
rin cîhanîna zagonê ye.
11 Û vêya bikin; ji ber, hûn demê
dizanin ku, bi rastî ji bo we saeta
ji xewê hişyarbûnê ye; ji ber ku
niha xelasiya me, ji dema me ba-
werî anîbû hîn jî nêztir e. 12 Şev
pêş ve çû û roj nêzîk bûye; bo vê
yekê em karê tariyê ji ser xwe
bavêjin û çekên ronahiyê li xwe
rapêçin! 13 Em ne bi qeşmerî û
serxweşî, ne bi bêexlaqiya cinsî û
sefahetê, ne bi koşîn û çavneba-
riyê ve, lê belê mîna ku di rona-
hiya rojê de, jiyanek birêzî bajon;
14 lê belê Xudan Îsa Mesîh li xwe
bikin û bona şehwetan peydayiya
bedenê nekin!

*Lawaz û xurt*

Rom 15,1-7; 1.Kor 4,3-5; Kol 2,16

14 Yê ku di baweriyê de la-
waz e qebûl bikin; lê belê
li ser fikrê wî, bi wî re nekevin
guftegoyê. 2 Yek bawer dike ku,
ew kare her tiştî bixwe; lê belê li
aliyê din yê ku lawaz e, tenê sew-
ze dixwe. 3 Yê ku dixwe, bila yê
naxwe biçûk nebîne û yê ku na-
xwe, bila yê dixwe daraz meke;
ji ber ku Xwedê ew qebûl kiriye.
4 Ma tu kî ye ku, daraziyê li qûlê
yekî din dikî? Yê ku qûl bi heq
jî dike, bi sûc jî dike efendiyê wî
bi xwe ye. Lê belê dê ew bi heq
derkeve; ji ber hêza Xudan heye
ku wî bi heq derxe. 5 Hin kes ji
rojekê re, ji rojên din ve zêdetir
hurmetê dike û hin kes jî hur-

[1] Bêşdan.

[2] (2.Mûsa 20:13-17)

metê ji her rojê re dike; bila her
kes di dîtina xwe de qanih be!
6 Yê ku giramiyê dide rojê, bona
Xudan giramiyê dide û yê ku
dixwe, bona Xudan dixwe, ji ber
ku ji Xwedê re şikir dike û yê ku
naxwe bona Xudan naxwe û ji
Xwedê re şikir dike.
7 Ji ber ku ji me tu kes bona xwe
najî û tu kes bona xwe namire.
8 Ji ber ku ger em bijîn, em ê bona
Xudan bijîn û ger em bimirin, em
ê bona Xudan bimirin; niha ger
em bijîn jî, bimirin jî, yê Xudan
in. 9 Ji ber ku Mesîh bona vêya
mir û dîsa vejiya, da ku, him bibe
Xudanê miriyan û him jî yê zin-
diyan. 10 Lê belê tu, çima tu bi-
rayê xwe daraz dikî? An tu, çima
birayê xwe biçûk dibînî? Ji ber ku
em ê hemû derkevin berya kursi-
ya Xwedê ya darazdanê. 11 Ji ber
ku hatiye nivîsandin:
Xudan dibêje:
Bona heqê hebûna min, dê her
çong li ber min bê xwarê û dê her
ziman Xwedê qebûl bike[1].
12 Bi vî awayî em her yek, di
derheqê xwe de hisabê bidin
Xwedê.
13 Bona vêya êdî em hev û din
daraz nekin; lê belê hîn jî zêde
bona kevirekî tilpekiyê, an jî xij-
bûnê daneynin ser rêya birayê
xwe bi biryar bin! 14 Ez dizanim
û di Xudan Îsa de bawer im ku; tu
tişt bi xwe ne mindar e; lê bona
kesê ku tiştekî mindar dihesibîne,
ew tişt mindar e. 15 Ji ber ku ger
bona xwarinekî birayê te biêşe,
êdî tu li gor hezkirinê nameşe.
Yê ku Mesîh di oxra wî de miri-
ye, bi xwarina xwe helaq meke!
16 Bila di derheqê qenciya we de
xerab neyê gotin. 17 Ji ber ku Ser-
weriya Xwedê ne pirsa xwarin û
vexwarinê ye, lê belê rastî[2] û
dilxweşî û di Ruhê Pîroz de
kêfxweşî ye. 18 Ji ber ku yê di vê
rêya de xizmetê ji Mesîh re dike,
dê Xwedê xoşnûd bike û eciban-
dina mirovan bi dest bixe.
19 Niha, bi vî awayî em xwe bi-
din karên ku dilxweşiyê ji me
re tîne û me pêş ve dibe. 20 Di
oxra xwarinê de karê Xwedê xera
meke! Her tişt paqij e, lê belê ji
kesê ku bi tilpekîbûnê dixwe re
xerab e. 21 Goşt nexwarina te,
xemr venexwarina te û tiştekî rê
bide tilpekiya birayê te çênekiri-
na te qenc e. 22 Baweriya xwe yî
di derheqê vê bûyerê de li berya
Xwedê ji xwe re veşêre. Kesê bi
tiştê ku tesdîq kiriye, xwe nede
darazê çiqas dilgeş e! 23 Lê belê
kesê ku şubhe bigire û bixwe, dê
bê daraz kirin; ji ber ku ji baweri-
yê nîne û her tiştê ku ji baweriyê
nîne guneh e.

1 Îşaya 45:23
2 Pakbûnî.

*Ne xwe, kesên din dilxweş bikin*
Rom 14,13-23; Fîl 2,1-5

15 Lê belê em, yên xurt, ne
deyndarê xwe xoşnûd ki-
rinê, deyndarê kişandina lawa-
ziyên yê nexurtan in. 2 Bila her
yekê ji me, di oxra pêş ve birinê
de, ji bo qenciyê cîranê xwe
xoşnûd bike. 3 Ji ber ku Mesîh jî
xwe xoşnûd nekir; lê belê mîna
ku hatiye nivîsandin: Ruswatiya
kesên ku te ruswa dikin, daket ser
min[1]. 4 Ji ber ku ji berê ve her çi
hatiye nivîsandin, bona hînkirina
me hate nivîsandin; da ku, bi sebir
û xemrevîniyên Nivîsên Pîroz ve
hêviya me hebe. 5 Bila Xwedayê
çavkaniya sebr û xemrevîniyê,
we li gor xwestina Mesîh Îsa di
fikrekê de bike yek; 6 da ku, hûn
pev re û bi devekî Xwedê û Bavê
Xudanê me Îsa Mesîh bilintir
bikin.
7 Ji ber vê yekê, mîna ku Mesîh
we qebûl kiriye, bona bilindahi-
ya Xwedê hûn jî hev û din qebûl
bikin!

*Ji ber dilovaniya wî, Xwedê bilind bikin*
Rom 11,31-36; Îbr 13,15

8 Lê belê ez dibêjim ku, Îsa Mesîh
bona ewledarbûna Xwedê xuyanî
bike, bû xizmetkarê bisunetiyê[2];
da ku, bila sozên bi bapîran ve
hatine dayîn rast bibin û 9 nete-
weyên din, bona dilovaniya wî,
Xwedê bilind bikin; mîna ku ha-
tiye nivîsandin:
Bo vê yekê, ez ê di nava netewan
de ji te re hemd bikim û ji navê te
re murxan bistirêm[3]!
10 Û dîsa dibêje: Ya neteweno, bi
gelê wî re kêfxweş bibin[4]!
11 Û dîsa: Ya hemû neteweno,
pesnê Xudan vedin! Û bila hemû
gel, wî bilindtir bikin[5]!
12 Û dîsa Îşaya dibêje:
Dê yekî ji reha Îşay bê û bona
serweriyê li ser gelan bike; dê gel
hêviya xwe bi wî ve girê bidin[6].
13 Lê belê Xwedanê çavkaniya
hêviyê, bona ku hûn bi hêza Ruhê
Pîroz ve bi hêviyê ve tijî bibin,
bila di baweriyê de we bi hemû
kêfxweşî û aştiyê ve tijî bike!
14 Ya birayên min; ez bi xwe jî di
derheqê we de bawer im ku, hûn
bi qenciyê û bi her zanînê ve hati-
ne xemilandin û hûn di wî rewşê
de ne ku dikarin şîretan bidin hev
û din. 15 Lê belê bi kerema Xwe-
dê ku ji min re bexşandiye; min
hîn zêde bi cesaretê ve nivîsandi-
na çend nexşeyên ku bînim bîra
we dît. 16 Ev kerema jî, bona xiz-
metkarbûna min ya ji Mesîh Îsa

---

1 An jî: Ez rastî biçûk dîtinên kesên ku te çûk dibînin hatim. Zebûr 69:9
2 An jî: Îsraêliyan.
3 Bibêjim. Zebûr 18:49
4 (5.Mûsa 32:43)
5 Zebûr 117:1
6 Îşaya 11:10

re, ya ji neteweyên ku kahîntiyê
ji Încîla Xwedê re dikin re ye; da
ku, bila pêşkêş kirina neteweyan
bi Ruhê Pîroz ve bête pîroz kirin
û meqbûl be.
17 Niha, di tiştên aidî Xwedê de
di Mesîh Îsa de pesnahiya min
heye. 18 Ji ber ku bona îtaetkiri-
na netewan, ez nawêrim ku bilî
çêkirinên Mesîh, yê bi navgîniya
min, bi gotin û lêkeran, 19 bi hêza
ku mûcîze û nuwazeyan diafirîne,
bi hêza Ruhê Pîroz ve çêkiriye
pê ve, qala tiştekî din bikim; ûsa
ku, ji Orşelîmê dest pê kirim û
heta herêma Îllîryayê bi gerê ve
Mizgîniya Mesîh, li her derê ve
bi temamî waz kirim. 20 Û bi vî
awayî bona ku li ser bingeha yekî
din, ava nekim, min xîret kir ku
Mizgîniyê, li cîhên navê Mesîh
nehatiye gotin waz bikim. 21 Lê
belê mîna ku hatiye nivîsandin:
Kesên di derheqê wî de xeber ji
wan re nehatiye dayîn, dê bibînin
û yên nebihîstine, dê fêhm bikin[1].

*Pêşniyariya çûna Romayê*

Rom 1,9-15; 2.Sel 3,1-2; 2.Kor 1,10-11

22 Bo vê yekê jî pirr caran tengasî
li ber hatina minî cem we çêkirin.
23 Lê belê niha bona ku li van
deran êdî tu karê ku ez çêkim ne-
maye û bi salan ve ye ku xwesteka
min heye ez bêm cem we, 24 dema
ku ez biçim Îspanyayê, ez ê werim
cem we jî; ji ber ku ez di wê hêvi-
ya de me ku, dema ez derbas bi-
bim pêşiyê we bibînim û demekê
bi hevaletiya we ve têr bibim,
dawiyê jî ji aliyê we ve oxirê wê
derê bibim. 25 Lê belê niha bona
ku ji pîrozan re xizmetekî bikim,
diçim Orşelîmê. 26 Ji ber ku yên
li Makedonyayê û Ahayayê ne, li
cîh dîtin ku alîkariyê bona xizanên
di nava pîrozên li Orşelîmê de ne,
bidin hev. 27 Belê, li cîh dîtin û
deyndarê wan in. Ji ber ku li gor,
netewan şirîkê tiştên wanî ruhanî
ne, deyndar in ku bi tiştên bûjenî
jî xizmeta wan bibînin. 28 Bi vî
awayî li pey qedandina vî karî û
alîkariya ku hatiye civandin bi-
gehînim wan pê ve, ez ê serîkî li
we bixim û pişt re herim Îspan-
yayê. 29 Û dema ku ez bêm cem
we, ez dizanim ku, ez ê bi tijîbûna
bereketa[2] Mesîh ve bêm.
30 Ya birano, bona Xudanê me
Îsa Mesîh û bona hezkirina Ruh,
ez li ber we digerim, bona ku ez
ji îtaetnekirên li Cihûdayê ne, xe-
las bibim 31 û xizmeta min ya ji
Orşelîmê re ye ji pîrozan re meq-
bûl be, di duayên xwe de bona min
ji Xwedê re, tevî min cehd bikin[3]!
32 Da ku, bi xwestina Xwedê, di

1 Îşaya 11:10
2 Berdariya.
3 Di duayên xwe de bona min ji Xwedê re dua bikin!

nava kêfxweşiyê de ez bêm cem
we û bi hevaltiya we ez bi we re
bêhna xwe bidim. 33 Û bila Xwe-
danê dilxweşiyê bi we hemûyan
re be! Amîn.

*Silav û xwestekên taybetî*

3.Yû 5,8; Fîl 4,21

16 Xizmetkara Dêra li Ken-
herê, xwuşka me Fîbî salixî
we didim; mîna ku li pîrozan bê,
wê bi navê Xudan qebûl bikin
2 û ger di tiştekî de motajiyek wê
ji we hebe, alîkariyê bi wê bikin;
ji ber ku, wê jî alîkariya gellekan
û ya min jî kiriye. 3 Ji Prîska û
Akvîla, yên di rêya Mesîh de
hemkedên min in re silav bikin;
4 wan di oxra canê min de jiyana
xwe avêtin talûkê; bona vêya ne
ez tenê, lê belê hemû Dêrên nete-
weyên din jî ji wan re spas dikin[1];
5 ji Dêra ku di mala wan de ye re jî
silav bikin! Ji yê ku nûberê Mesîh
yê Asyayê ye, xoşewîstê min Epe-
netûs re silav bikin. 6 Ji Meryema
ku bona we zehf şuxuliye re silav
bikin. 7 Ji meriv û hevalên minî
girtîgehê Andronîqûs û Yûnîas,
yê di nava şagirtan de zehf hatine
nas kirin û berî min bi Mesîh ve
bawerî anîne re silav bikin.
8 Di Xudan de xoşewîstê min, ji
Ampliyatûs re silav bikin. 9 Di
Mesîh de hemkedê me ji Ûrbanûs
re û ji xoşewîstê min Stakîs re si-
lav bikin. 10 Ji Apellîsê di Mesîh
de hatiye ecibandin re silav bikin.
Yên ji maliyên Arîstobûlûs in
re silav bikin. 11 Ji merivê min
Hêrodiyon re silav bikin. Ji mali-
yê Narkîs yê ku aidî Xudan in re
silav bikin. 12 Ji Trîfêna û Trîfosa
yê di Xudan de duşuxulin re silavê
bikin. Ji Persîsê xoşewîst yê pirr di
Xudan de şuxuliye re, silav bikin.
13 Ji Rufûsê di Xudan de hatiye
hilbijartin û ji diya wî ya ji min re
jî diyêtî kiriye re silav bikin. 14 Ji
Asînkrîtûs, Flêgon, Hêrmes, Petro-
vas, Hêrmas û hemû birayên li cem
wan in re silav bikin. 15 Ji Fîlolo-
gûs û Yûlîa, ji Nêreyûs û xwuşka
wî û ji Olîmpas û hemû pîrozên li
cem wan in re silav bikin. 16 Sila-
vê, bi ramûsana pîroz ve bidin hev
û din! Hemû Dêrên Mesîh, silavê
li we dikin.

*Îkazên dawîn*

1.Tîm 6,3-5; Tît 3,9-11; 2.Pêt 2,1-3

17 Niha, ya birano, ez li ber we
digerim, li kesên ku li dijbera hîn-
kirina ku we girtiye radibin û di-
bin sedemê veqetandin û rêguher-
tinê balkêş bin û ji wan ve, li xwe
miqate bibin! 18 Ji ber ku kesên
ûsa ne ji Xudanê me Mesîh re, lê
belê ji zikê xwe re xizmetê dikin
û dilê kesên saf bi gotinên xwe
yî çaplûsî yên bi guhan ve xweş
tê dixapînin. 19 Ji ber ku îtaetki-

[1] Minetdarên wan in.

rina we gihaşt guhê her kesî. Bo
vê yekê, ez ji bo we kêfxweş di-
bim; lê belê dixwazim ku di ba-
beta qencîtiyê de hûn zaniyar û di
babeta xerabiyê de bêceribandin
bin. 20 Û Xwedayê dilxweşiyê,
pirr derbas nebe dê Îblîs di binya
lingên we de bieciqîne.
Bila kerema Xudanê me Îsa Mesîh
bi we re be!

*Dua û silav*

Ef 3,5-11; 3,20-21; Cihû 24-25

21 Hemkedê min Tîmotêyos, ji
merivên min Lûqyûs û Yason û
Sosîpater silavê li we dikin. 22 Yê
ku nameyê derbasî nivîsê kiriye,
ez Tertiyûs, di Xudan de ji we re
silav dikim. 23 Gayûsê ji min û ji
hemûya Dêrê re mêvanperestiyê
dike, silavê li we dike. Xeznedarê
bajêr Êrastûs û birayê Kûartûs ji
we re silav dikin. 24 Bila xêra Xu-
danê me Îsa Mesîh bi we hemû-
yan re be! Amîn.
25 Niha, li gor daxuyanî kirina
raz[1] a ku, li gor Mizgîniya min û
li gor waza Mesîh Îsa, ji demên
bêpêşî ve veşartî maye; 26 lê belê
niha eşkere bûye û li gor emrê
Xwedayê bêpêşî bi navgîniya
pirtûkên peyxamberan ve ji hemû
neteweyan re, bona ku li ber bawe-
riyê îtaetê bikin hatiye agihandin;
ji Xwedayê alimê tekane ye re,
27 yê bona pêdandina we şiyandar
e, bila bi navgîniya Îsa Mesîh ve,
abadîn bilindahî bibe! Amîn.

1 Sir.

# NAMEYA PAWLOS YA YEKEMÎN JI KORÎNTIYAN RE

PAQIJIYA RUH

*Pêşgotin*

Nûçevan Pawlos, cara yekemîn di sala 50'yan de hate bajarê Korîntê û sal û nîvek li wir ma. (K.Şa. 18:11,18) Ev bajarê girîng, di binya giravekî tengî ya bakûrê Grekîstanê bi başûrê wê ve girê dide bû. Navenda kêf û ticaretê bû. Senemperestiya li wir, bona hemû xerabiyan vekirîbû. Pawlos di sala 55'an, an jî di 56'an de dîsa vegeriya vî bajarî (K.Şa. 20:3). Wekî din, qala serîdanek kurt jî dike (2.Kor. 2:1). Ev serî dana, xuya dike ku, çiqas hewcedariya civaka bawerkiran (Dêrê) ji alîkariyê ve heye. Mirovên Korîntî, nameyekê ji Pawlos re şandin û xwestin ku di hinek babetan de alîkariyê bi wan re bike (1.Kor. 1:1; 16:7). Pawlos, xeynî van her sê serîdanên xwe, nameyên bi peyxamgirtina Xwedê jî ji vê civakê re nivîsand. Vana ji hinek pirsgirekên civakan re bûn bersiva ku Xwedê dide: Mîna ku zewac, berdan, di têkiliyên cinsî de Xwedê çi emir daye? Goştên ji pûtan re hatine pêşkêşkirin tên xwarin? Û hwd. Mirov dikare vê nameya ku di sala 54'an de hatiye nivîsandin, bi vî awayî kurt bike:

1. Destpêk 1:1-9
2. Cihêtiyên di civakê (Dêrê) de derdikevin 1:10-4:21
3. Kesên ji jiyana birêz ve diqetin 5:1-6:20
4. Babeta zewacê 7:1-40
5. Azadiya bawerkiran çî ye? 8:1-11:1
6. Peristina rast 11:2-14:40
7. Vejîna miriyan 15:1-58
8. Pirsgirêkên din 16:1-24

*Destpêk û silav*

1 Ji Pawlos, yê bi viyana[1] Xwedê hatiye bang kirin ku bibe şagirtê Mesîh Îsa û ji birayê Sostênîs ve, 2 ji yên ku bona pîrozkirinê hatine bang kirin û di Mesîh Îsa de hatine pîroz kirin re, yanê, ji Dêra Xwedê[2] ya li Korîntê ye re û

[1] Daxwaz, îrade.

[2] Civaka Xwedê.

ji hemûyên ku navê Xudanê wan
û yê me[1] Îsa Mesîh, di her derê de
bang dikin re: 3 Bila ji bavê me
Xwedê û Xudanê me Îsa Mesîh ve
xêr û xweşî ji we re bibe!

*Şikirî ji bo kerema Xwedê*

Fîl 1,3-6; Kol 1,3-11

4 Ji ber kerema ku Xwedê di Îsa
Mesîh de ji we re bexşandiye, ez
her demî bona we, ji Xwedayê
xwe re şikir dikim; 5 ji ber, mîna
ku şahdeyiya di derheqê Mesîh
de di we de hate zeximandin, hûn
di wî de û di her tiştî de, di her
gotin û her zanînê de dewlemend
bûn; 6 ûsa ku, dema hûn li benda
xuyabûna Xudanê me Îsa Mesîh
in; 7 di tu xelatekî xêrê de kêma-
siya we nîne; 8 ew jî, bona ku hûn
di roja Xudanê me Îsa Mesîh de
bêqisûr bin, dê we heta dawiyê
bizexmîne. 9 Xwedayê ku hûn
ji aliyê wî ve bona şirîkantiya[2]
Lawê wî, Xudanê me Îsa Mesîh
hatine bang kirin, dilsoz e.

*Di Civaka Bawerkiran de cihêbûn*

1.Kor 3,3-8; 3,21-22

10 Lê belê ya birano, ez bi navê
Xudanê me Îsa Mesîh ji we rica
dikim ku, eynî tiştî bibêjin û bila di
nav we de cihêtî tune be, lê belê di
eynî raman û eynî reyî de bi yekîtî
bin. 11 Ji ber ku, birayên min, ez
ji maliyên Kloî ve hîn bûm ku di
nava we de koşînî hene. 12 Û ez
dixwazim vêya bibêjim ku, her
yekî ji we dibêje: Ez alîgirtê Paw-
los im! Û ez alîgirtê Apollos im! Û
ez alîgirtê Kîfas im! Û ez alîgirtê
Mesîh im!
13 Ma Mesîh par bûye? Ma Pawlos
bona we hate xaçkirin? An hûn bi
navê Pawlos ve hatin vaftîz kirin?
14 Ez ji Xwedê re şikir dikim ku,
bona kes nebêje bi navê min hatiye
vaftîz kirin ku 15 min ji nava we,
xeynî Kirîspo û Gayos kesî vaftîz
nekiriye. 16 Û wekî din jî min
maliyên Steyfan vaftîz kir, xeynî
vêya ez nizanim ku min kesek din
vaftîz kiriye. 17 Ji ber ku Mesîh
min ne bona vaftîz kirinê, lê belê
bona ku xaça Mesîh betal nebe, ne
bi piştdana gotinên zaniyarî, bona
waz kirina Mizgîniyê şand.

*Mesîhê zaniyarî û hêza Xwedê*

Rom 1,16; Met 11,25-27; 2.Kor 4,3-6

18 Ji ber ku gotina xaçê, bona
kesên helaq dibin bêaqiltî ye, lê
belê bona me, yên ku xelas dibin
hêza Xwedê ye. 19 Ji ber ku hati-
ye nivîsandin:
Ez ê zanîna zanyaran tune bikim
û fêhmkariya fêhmkeran betal
bikim[3].

---

1 An jî: Him li cem wan, him jî li cem me.
2 Pişkdarî, hevbeşî.
3 Îşaya 29:14

20 Ma zaniyar li ku ye? Ma alimê
zagonê li ku ye? Guftegogerê bi
huner yê dinê li ku ye? Ma Xwe-
dê zaniyariya dinê venegerand
bêaqiltiyê? 21 Ji ber, madem ku
dinyayê li gor zanyariya Xwedê,
Xwedê bi zaniyariyê nas nekir,
Xwedê jî bi xelaskirina bawerki-
ran, bi waz kirina ku bêvac hati-
ye hesibandin razî hat. 22 Ji ber
ku Cihûdan elametan dixwazin
û Grekan li zaniyariyê digerin;
23 lê belê em, Mesîhê ku hatiye
xaçkirin waz didin; yê ji Cihûdan
re rûreşiyek, ji neteweyan re bêe-
qiltî ye; 24 lê belê Mesîh, bona
kesên ku hatine bang kirin, di-
xwaze bila Cihûd bin, dixwaze jî
Grek bin, hêza Xwedê û zanyariya
Xwedê ye. 25 Ji ber ku, bêvaciya
Xwedê ji zaniyariya mirovan hîn
jî bilindtir e û lawaziya Xwedê ji
hêza mirovan hîn jî bi hêztir e.
26 Lewma li banga xwe bi-
nihêrin, ya birano! Li gor bedenê
yên gellekî zanyar, gellekî bihêz,
gellekî bi esil nehatine bang kirin;
27 lê belê Xwedê, bona zaniyaran
bişermîne, tiştên ku dinyayê
bêvac hesibandiye bijart û Xwedê
bona yên bihêz bişermîne, tiştên
dinyayê yên lawaz bijart. 28 Û
Xwedê, bona tiştên ku dinyayê
girîng hesibandine daxîne tuneyi-
yê, yên ku dinyayê bêqîmet, bêe-
sil û ne girîng dîtiye bijart; 29 ûsa
ku, bila tu mirov li berya Xwedê
pesnê xwe nede. 30 Lê belê hûn
bi saya wî di Mesîh Îsa de ne; ew
ku, ji aliyê Xwedê ve ji me re bû
zaniyarî û rastî û pîrozî û xelasî;
31 bo vê yekê, mîna ku hatiye ni-
vîsandin:

Yê pesnê xwe dide, bila bi Xudan
ve pesnê xwe bide[1]!

*Danasîna xaçkirina Îsa Mesîh*

1.Kor 1,17-25; 2.Kor 4,5-7; 1.Sel 1,5; 2,3-4

2 Û ya birano, gava ez hatim
cem we û danezana şahdeyiya
Xwedê kirim, ez bi gotinên bi
çalak û bi zaniyariyakî bilind
nehatim. 2 Ji ber, bona ku ez
di nava we de xeyrî Îsa Mesîh
û xaçkirina wî, tiştekî din
nizanibim, bi biryarbûm. 3 Û ez
di nava we de di lawazî û tirsê de
û di gellekî lerizandinê de bûm.
4 Û gotina min û waza min, xwe
ne spartibû gotinên qanihkir yên
zaniyariya mirovî, lê belê xwe
spartibû hêza Ruh ya îspatker[2];
5 da ku, bila baweriya we ne li
ser zaniyariya mirovî, lê belê li
ser hêza Xwedê be.

*Zaniyariya Xwedê*

Ef 3,2-11; Yû 16,13-15; 1.Yû 2,20.27

6 Lê belê em di nav yên gehîştine
de hîkmetê dibêjin; lê ne hîkme-

[1] Yêremya 9:23-24

[2] Peyitandin.

ta vê dinê, ne jî serokên vê dinê
yên ku dawiya wan tê ye[1]; 7 lê
belê em di razê de qala zaniyariya
Xwedê ya veşartî, ya ku Xwedê
berî destpêka dinyayan, bona bi-
lindahiya me pêşkêş kiriye[2], di-
kin; 8 tu serokên vê dinê, bi wê
nizanîbûn; ji ber ku ger wan bi-
zanîbana, Xudanê bilindahiyê xaç
nedikirin; 9 lê belê mîna ku hatiye
nivîsandin:
Yê ku tu çav nedîtiye û tu guh ne-
bihîstiye û neketiye dilê mirovan[3],
yanê, hemû tiştên ku Xwedê bona
hezkirê xwe amade kiriye.
10 Lê belê Xwedê wana, bi nav-
gîniya Ruh ve agahî me kir; ji ber
ku Ruh hemû tiştan, heta ku ra-
manên Xwedê yên kûr jî dikole.
11 Ji ber ku bi ramanên mirovan,
di nava mirovan de ma xeynî ji
ruhê ku di hundirê wî de ye qenc-
tir kî dizane? Û bi vî awayî, bi
ramanên Xwedê jî, xeynî Ruhê
Xwedê kes nikare bizanibe.
12 Lê belê me ne ruhê dinê, lê
Ruhê ku ji Xwedê ve ye stendin;
da ku, em tiştên ji aliyê Xwedê ve
ji me re hatiye dayîn bizanibin.
13 Em vana ne bi gotina ku hîk-
meta mirovî dide hînkirin, lê bi
gotina ku Ruh tiştên ruhanî bi go-
tinên ruhanî ve dineqşîne û dide
hînkirin dibêjin. 14 Lê belê mi-
rovê xweza tiştên ku di derheqê
Ruhê Xwedê de ye qebûl nake; ji
ber ku vana ji wî re bêaqil tên û
ew nikare wan fêhm bike; ji ber
ku ji aliyê ruh ve têne daraz kirin.
15 Lê belê mirovê ruhanî, hemû
tiştan daraz dike; lê ew bi xwe ji
aliyê tu kesî ve nayê daraz kirin.
16 Ji ber ku, ma kî bi ramanên
Xudan zanî ku, hînî wî bike?
Lê belê ramanê Mesîh di me de ye.

*Mirovê cismanî*

1.Kor 1,11-15; Îbr 5,11-14

3 Ya birano, hêz neanîm ku, ji
we re, mîna ku ji ruhaniyan re
dibêjim, bibêjim; lê wekî ji cis-
maniyan re û di Mesîh de ji za-
rokan re bibêjim, gotim. 2 Min
şîr da we, ne xwarinên hişk; ji
ber ku we hîn nikarîbûn xwarina
hişk bixwarana û niha jî hûn ni-
karin bixwin; 3 ji ber ku hûn hîn
cismanî ne; ji ber, madem ku çav-
nebarî û keftûleftî di nava we de
heye, ma hûn ne cismanî ne? Û
ma hûn li gor mirov nameşin? 4 Ji
ber ku ger yek bibêje: Ez yê Paw-
los im! Û yê din: Ez yê Apollos
im! Ma hûn ne cismanî ne[4]?
5 Ji ber ku Apollos kî ye û Paw-
los kî ye? Li gor ku Xudan daye
her yekî, xizmetkarên ku we bi
navgîniya wan baweriyê anîne ne.

1 Ji cîhê xwe ve dibin.
2 Nîşan daye.
3 An jî: Dilê tu mirovî fêhm nekiriye.
4 An jî: Ma hûn ne mirov in?

6 Min daçikland, Apollos av da;
lê belê Xwedê mezin kir. 7 Bi vî
awayî ne yê çandî, ne jî yê avdayî
tiştek nîn in, lê belê Xwedayê ku
yê hatiye çandin mezin kiriye yî.
8 Niha yê çandî û avdayî yek in; lê
belê her yek dê mişeya xwe li gor
keda xwe bistîne. 9 Ji ber ku em
kedkarên Xwedê ne û hûn jî zevi-
ya Xwedê û xaniyê Xwedê ne.

*Perestgeha Xwedê ya Pîroz*

Ef 2,20-22; 1.Pêt 2,4-6; 2.Tîm 2,15;
1.Tîm 4,16; 1.Kor 6,15-20

10 Min li gor xêra Xwedê, ya
ku ji min re hatiye dayîn, mîna
mîmarekî[1] zaniyar, bingeh danî;
kesên din jî li ser vê bingehê ava
dikin. Lê belê bila her kes bala
xwe bidinê ku ka çawa li ser wê
ava dikin. 11 Ji ber ku tu kes, xey-
nî bingeha hatiye danîn, yanê,
xeynî Îsa Mesîh nikare bingehek
din deyne.
12 Lê belê ger kesek li ser vê bin-
gehê bi zêr, zîv, kevirên biqîmet,
dar, gîha, qamîş ava bike, 13 dê
karê her kesî eşkere bibe; dê roj
wê bide xuya kirin; ji ber ku dê
bi agir ve eşkere bibe; ka karê her
yekî çi celeb e dê agir bi xwe bide
îspat kirin. 14 Ger karê yekî ku li
ser wê ava kiriye bisekine, dê ew
kes mişeyê bistîne. 15 Ger karê
yekî bişewite, dê ziyanê[2] bike; lê
belê ew bi xwe xelas bibe, lê dê
bibe mîna ku di nava agir de der-
bas bûye.
16 Ma qey hûn nizanin ku, hûn
perestgeha Xwedê ne û Ruhê
Xwedê di we de disekine[3]?
17 Ger kesek, perestgeha Xwedê
xera bike, dê Xwedê wî xera bike;
ji ber ku perestgeha Xwedê pîroz
e û ew perestgeh hûn in.
18 Bila tu kes xwe bi xwe nexapî-
ne! Ger yekî di nava we de, xwe
li gor pîvana vê dinê zaniyar bi-
hesibîne, bila bona zaniyar bibe,
bêaqil bibe! 19 Ji ber ku zani-
yariya vê dinê, di çavê Xwedê de
bêaqilî ye; ji ber ku hatiye nivî-
sandin: Ew, zaniyaran di hîleyên[4]
wan de digire[5]. 20 Û dîsa: Xudan,
valahiya ramanên zaniyaran di-
zane[6]. 21 Bo vê yekê bila tu kes,
bi mirovan ve pesnê xwe nede; ji
ber ku her tişt yê we ne: 22 Divê
Pawlos, an Apollos, an Kîfas, an
dinya, an jiyan, an mirin, an dema
niha, an jî ya ku bê, her tişt yê we
ye; 23 lê belê hûn yê Mesîh in,
Mesîh jî yê Xwedê ye.

*Şagirtên Mesîh*

Ef 3,1-11; Kol 1,25-29; Rom 14,10-12

4 Bi vî awayî, bila mirovan
me xizmetkarê Mesîh û wekî

---

[1] Qesirbend.
[2] Zerarê, xesarê.
[3] Rûdine, an jî: Dijî.
[4] Fenekiyên.
[5] Eyûb 5:13
[6] Zebûr 94:11

keyayê hemrêzên[1] Xwedê bihe-
sibînin. 2 Xeynî vêya, li vir tiştê
ku ji keyayan tê xwestin, dilso-
ziya kesekî ye. 3 Lê belê, ji aliyê
we, an jî li aliyê dadgehekî mirovî
ve daraz bûyîn, bona min tiştekî
herî biçûk e; ez xwe bi xwe jî da-
raz nakim. 4 Ji ber ku ez li dijî
xwe tu tiştekî nizanim[2]; lê belê ev
min pak nake; lê yê ku min daraz
dike Xudan e. 5 Bi vî awayî, heta
ku Xudan were, berî wexta wê ji
tiştekî re daraziyê mekin; tiştên
dizî yên tariyê ew dê ronî bike û
ew dê mirazên dilan eşkere bike û
wê demê dê pesnvedana her mi-
rovî ji Xwedê be.

*Çiyî te heye ku te ji Xwedê nestendiye?*

2.Kor 6,4-13; Fîl 2,19-22

6 Û ya birano, ji ber we, van tiştan
ji xwe re û Apollos re bi kar anîm;
da ku, hûn xeynî tiştên ku hatine
nivîsandin fikrandinê ji me hîn
bibin û bila tu kes, bona yekî, ji
yê din re qurre nebe. 7 Ji ber ku
ma kî te cihê daniye? Û ma çiyî
te heye ku te nestendiye? Û ger te
stendiye, çima mîna yê ku nesten-
dibe, pesnê xwe didî?
8 Jixwe hûn hatin têr kirin, jixwe
hûn dewlemend bûn; bêyî me we
serweriyê ajotin! Û xwezîka we
bi rastî jî serweriyê bajotina û me
jî bi we re serweriyê bajotina! 9 Ji
ber, ez zen dikim ku, Xwedê, me
şagirtan mîna mehkûmên mirinê,
bi yên ji herî dawiyê tên li ber
çavan raxist; ji ber ku him bona
milyaketan, him jî bona mirovan,
bona hemû kaînatê em bûn tiştekî
ku bê temaşe kirin. 10 Em bona
Mesîh bêaqil in, lê belê hûn di
Mesîh de baqil in! Em lawaz in,
lê belê hûn xwurt in! Hûn kesên
qedirbilind in, lê em kesên bêqî-
met in! 11 Heta vê saetê em bir-
çîtî û tîbûniyê dikişînin û tazî ne
û li me dixin û cîhekî me yî em
pê bisitirin nîne 12 û em bi destê
xwe dixebitin û kedê didin; dema
xebera ji me re didin, em qenciyê
dixwazin; dema zilmê li me dikin,
em sebir dikin; 13 dema îftira li
me dikin, em li ber digerin[3]; heta
niha em bûn gihûrê dinê û xera-
tokê her tiştî.
14 Ez, ne bona we şermezar
bikim, lê belê mîna zarokên xwe
yî xoşewîst şîretan bikim, van
tiştan dinivîsînim. 15 Ji ber ku, ger
di Mesîh de deh hezar hînkerê we
hebin jî, gellek bavên we tunin; ji
ber ku ez bi navgîniya Mizgîni-
yê ve di Mesîh Îsa de bûm bavê
we. 16 Niha, ez bona ku hûn min
mînak bigirin, ji we rica dikim!

1 Sir.
2 Ez qet qisûrê di xwe de nabînim.
3 Em bi xweşikayî bersivê didin, an jî: Xemrevîniyê dikin.

17 Ji ber vê yekê, di Xudan de
gedeyê xwe yî xoşewîst û dilsoz
Tîmotêyos ji we re şandim; ew dê
ji we re rêyên ku li her derê, li her
Dêrê didim hîn kirin û di Mesîh
de li pey diçim bîr bîne.
18 Hin kesan dibêjin qey ez ê ne-
yêm cem we, zimandirêjiyê dikin.
19 Lê belê ger Xudan bixwaze,
ez ê di nêzîk de werim cem we û
wê demê ne gotinên wan ziman-
dirêjan, lê belê ez ê bi hêza wan
bizanibim. 20 Ji ber ku Serweri-
ya Xwedê ne di gotinan de, lê di
hêzê de ye! 21 Hûn çi dixwazin?
Ma ez bi dar werim cem we, an bi
hezkirin û ruhê nerm ve?

*Birayê ku bi bêexlaqiyê ve ketiye*

Met 18,15-18; 1.Sel 4,3-8; 5.Mûs 19,19; Gal 5,9

5 Bi rastî di nava we de hebûna
zinê tê bihîstin û zînayek ûsa
ku di nava neteweyan de jî nayê
dîtin; heta yekî jina bavê xwe gir-
tiye! 2 Û hûn, ji ber yê ku vî karî
kiriye ji nav we nehatiye avêtin[1],
ji bilî şînê bigirin, dinepixin. 3 Ji
ber ku ez bi bedenî windayî lê belê
bi ruhî, bi amadebûnê ve, wekî ji
zilamê ku vêya bi vî awayî bikar
aniye amade bim, jixwe daraziyê
dam; ev jî 4 bi navê Xudanê me
Îsa, ruhê we û min bi hêza Xudanê
me Îsa, wekî civiyabin, 5 bona ku
beden helaq bibe vî zilamî bidin
destê Îblîs; da ku, bila ruhê wî di
roja Xudan Îsa de xelas bibe.
6 Pesnvedana we ne qenc e! Ma
qey hûn nizanin ku hinek havên,
hemû hevîr tirş[2] dike? 7 Havêna
kevin bimalin û bavêjin derve[3]!
Da ku, çawa hûn bê havên bin,
hûn bibin hevîrek nû! Ji ber ku
Mesîhê berxika me yî Fisihê jî
hatiye qurban kirin. 8 Bo vê yekê
ne bi havêna kevin, ne jî bi havê-
na xerabî û girrî, lê belê bi nanê
bêhavên yê ji dil û rastiyê ve
cejnê bikin.
9 Min di nameya xwe de bi kesên
ku bêexlaqiyê dikin re hevaltiyê
mekin nivîsand; 10 bê şik min
nexwest ku ez bibêjim bi bêex-
laqên, an çavbirçiyên, an rêbirên,
an jî senemperestên vê dinê ve;
gava wusa ba, hûn hewcedarbûn
ku ji vê dinê derketana! 11 Lê
belê kesekî bi biratî tête nasîn, ger
bêexlaq, an çavbirçî, an senempe-
rest, an kufirbaz, an serxweş, an jî
rêbir be, bi wî re hevaltî nekirina
we, bi kesekî ûsa re heta xwarinê
jî nexwarina we, ez niha ji we re
dinivîsînim. 12 Ji ber, ma çi heqê
min heye ku ez kesên li derve ne
daraz bikim? Yên ku hûn jî daraz
bikin, ma ne kesên ku di hundir

[1] Rakirin.
[2] Bihavên.
[3] Havênê kevin rabikin, an jî: Ji havêna kevin safî û paqij bibin.

de ne? 13 Lê belê yên li derve ne[1],
dê Xwedê daraz bike. Zilamê xe-
rab ji nava xwe biqewirînin!

*Di derheqê dozan de*

Aqûp 4,1; Met 5,38-41; 5,23-26;
Rom 12,17-21

6 Ma yekî ji we, yê ku doza wî li
dijî yekî din heye, gelo diwêre
ku ne li hizûra pîrozan, lê li hizûra
bêbaweran bête daraz kirin? 2 An
jî; ma qey hûn nizanin ku yên pîroz
dê dinê daraz bikin? Û ger dinya
ji aliyê we ve bête daraz kirin, ma
di daraziya tiştên herî biçûk de hûn
bêyî şayanî ne? 3 Dozên di der-
heqê vê jiyanê de li alîkî, ma qey
hûn nizanin em ê heta milyaketan
jî daraz bikin? 4 Niha, divê ger hûn
daraziyê li tiştên ku aidê vê jiyanê
bikin, ma hûn ê yên di Dêrê de yên
herî ne girîng ji darazkirinê re bidin
rûniştin? 5 Bona ku we bişermînim
dibêjim: Ma qey di nav we de
kesekî zana, yê di nav birayan de
darazgeriyê bike tune ye? 6 Lê
belê bira dozê li bira vedike û ev jî
di hizûra bêbaweran de[2]!
7 Bi rastî, doz hebûna we yî bi
hev û din re jî ji we re bi tumî
binketin e. Hîn jî bi zêdeyî çima
hûn neheqiyê nakişînin? Hîn jî bi
zêdeyî çima hûn mexdûr nabin?
8 Lê belê hûn bi xwe neheqiyê
dikin û xedariyê dikin; vêya jî ji
birayan re.

*Îkazên li dijî guneh kirinê*

Ef 5,3-8; Tît 3,3-7; 1.Sel 4,1-7;
1.Pêt 1,14-19

9 Ma qey hûn nizanin ku gunehkar
nikarin Serweriya Xwedê mêras
bigirin? Mexapin! Ne yên bêexla-
qiyên cinsî dikin, ne senemperes-
tan, ne zînakiran, ne qûlamparan,
ne homoseksuelan, 10 ne dizekan,
ne çavbirçiyan, ne serxweşan, ne
kufirbazan, ne jî rêbiran dê Serwe-
riya Xwedê bi mêrasî bigirin. 11 Û
hinek ji we ûsa bûn; lê belê we xwe
şuşt û hûn pîroz hatin danîn, hûn
bi navê Xudan Îsa Mesîh û bi nav-
gîniya Ruhê Xwedanê me ve hatin
salih kirin[3]!
12 Ji min re her tişt serbest e, lê
belê her tişt ne bi fêde ye! Ji min re
her tişt serbest e, lê ez nakevim bin
serweriya tiştekî! 13 Xwarin bona
mahdê û mahd jî bona xwarinê ye;
lê belê dê Xwedê him wê û him jî
wan ji navendê rake. Lê belê beden
ne bona zinê, lê belê bona Xudan
e; Xudan jî bona bedenê ye. 14 Û
Xwedê him Xudan vejand, dê him
jî me bi qudreta xwe bivejîne. 15
Ma hûn nizanin ku, bedenên we en-
damên Mesîh in? Qey ez endamên
Mesîh rahêlim û bikim endamê

1 Yanê yên li derveyî Civakê (Dêrê) dimînin.
2 Li ber bêbaweran, li pêşiya bêbaweran.
3 Pakbûn.

fahîşekê? Haşa! 16 An jî ma hûn nizanin yê ku tevî fahîşê dibe[1], bi wê re dibe bedenek? Ji ber ku dibêje: Dê her du bibin bedenek[2]. 17 Lê belê kesê ku bi Xudan ve bizeliqe[3], dê bi wî re bibe ruhek. 18 Ji zinê ve bireve! Gunehên din yên ku mirov dikin, hemû di dervê bedenê ye, lê belê kesê ku zinê dike, li dijî bedena xwe guneh dike. 19 An jî ma hûn nizanin ku, bedena we perestgeha Ruhê Pîroz ku we ji Xwedê girtiye û di hundirê we de ye û hûn ne aidî xwe ne? 20 Ji ber ku bi berdêlê hûn hatin kirîn; bo vêya Xwedê di bedena xwe de bilind bikin!

*Di derheqê zewacê û nezewicandinê de*

1.Mûs 2,18-25; Met 19,3-12

7 Niha em bên babetên ku we ji min re nivîsandine. Bona zilam, dê dest nedana pîrekê qenc e[4]. 2 Lê belê ji ber zinê, bila pîrekek ya her zilamî û zilamek her pîrekî hebe. 3 Bila zilam mafê pîreka xwe û bi vî awayî pîrek jî mafê zilamê xwe bide. 4 Li ser bedena xwe ne serweriya pîrekê, lê ya zilamê wê heye û bi vî awayî jî li ser bedena xwe ne serweriya zilam, lê ya pîreka wî heye. 5 Xeynî dema duayê ku bi xwesteka her du alî çêdibe, hev û din mehrûm mekin û dîsa tevî hev bin, da ku, bila Îblîs, bona ku hûn bi xwe nikarin we nexapîne.

6 Lê belê ez vêya ne mîna emrekî, mîna rêya li hevkirinê dibêjim. 7 Ji ber, min dixwest ku hemû mirov wekî min bin; lê belê hinek ûsa, hinek wusa xelatek ruhanî ya ji Xwedê ve para her kesî heye.

8 Lê belê ez ji yên nezewicîne re û ji pîrekên bî re dibêjim: Ger mîna min bimînin, ji bo wan qenctir e. 9 Lê belê ger bi xwe nikaribin, bila bizewicin; ji ber ku zewac, ji şewata bi şehwetê ve qenctir e.

*Jinberdan qedexe ye*

Marq 10,2-12; Rom 7,2-3; 1.Kor 7,39

10 Lê belê ji kesê zewicî re ne ez, lê Xudan emir dide: Bila pîrek ji zilamê xwe cuda nebe; 11 (lê belê ger cuda bibe jî, bila bê mêr bimîne, an jî bila ew û zilamê xwe li hev bên) û bila zilam pîreka xwe bernede.

12 Lê belê ji yê din re ne Xudan, ez dibêjim: Ger pîrekek birayekî baweriyê neaniye hebe û ger pîrek bi rûniştina tevî wî re razî bibe, bila ew dev ji wê bernede. 13 Û ger zilamê pîrekekê baweriyê neaniye hebe û ew bi rûniştina tevî wê re razî bibe, bila ew dev ji zilamê xwe bernede. 14 Ji ber ku zilamê bawerî neaniye, bi navgîniya pîre-

[1] Dizeliqe.
[2] (1.Mûsa 2:24)
[3] Bigire.
[4] Nezewicandina zilam qenc e.

ka xwe tê pîroz kirin û pîreka ba-
werî neanîye, bi navgîniya zilamê
xwe tê pîroz kirin; an na zarokê we
jî dê mindar bibûna; lê belê niha
pîroz in. 15 Lê belê yê baweriyê
neaniye, ger cuda dibe[1], bila cuda
bibe[2]! Bira an jî xwuşk, ne di bin
dîlitiyê de ne[3]; lê belê Xwedê di
nav aşîtiyê de bangî me kir. 16 Ji
ber ku, ya pîrek, ma tu çi dizanî ku
tuyê zilamê xwe xelas bikî? An jî,
ya zilam, ma tu çi dizanî ku tuyê
pîreka xwe xelas bikî?

*Bila her kes li gor banga ku girtiye bijî*

Ef 6,5-9

17 Lê bila her kes, li gor rewşa
ku Xudan ji wî re bijartiye, li gor
banga ku ji Xwedê stendiye bijîn!
Û di hemû Dêran de bi vî awayî
temmî dikim. 18 Dema mirovek
bisunetî bû, lê hate bang kirin, bila
bêsunet nebe; mirovek dema bêsu-
net bû, lê hate bang kirin, bila su-
net nebe. 19 Bisunetbûn ne tiştek
e û bêsunetbûn ne tiştek e; lê belê
bi girtina[4] emirên Xwedê. 20 Her
kes di çi rewşê de hatiye bang ki-
rin, bila di wê rewşê de bisekinin.
21 Dema tu dîl bû bangî te kirin,
xemgîn nebe! Lê belê ger tu dika-
ribî azad bibe, fersendê nerevîne[5]!
22 Ji ber kesê ku dema banga Xu-
dan girt dîl bû, niha azadê Xudan
e; yê bi azadî hatiye bangkirin jî
dîlê Mesîh e. 23 Hûn bi bihayê ve
hatin stendin[6], ji mirovan re nebin
dîl! 24 Birano, her kes di çi rewşî
de hatibe bang kirin, bila li berya
Xwedê di wê rewşê de bisekine.

*Yên nezewicîne*

2.Pêt 3,11-13

25 Lê belê di derheqê keçikan
de, ji Xudan ve emrê min nîne;
lê belê mîna yekî liyaqî ewle-
kariyê bête dîtin, ji aliyê Xudan
ve gîhaştiye dilovaniyê bim, ez
rayê didim. 26 Bi vî awayî ez zen
dikim ku, niha bona tengasiyan
mirov mîna xwe bimîne çêtir e.
27 Ma tu bi pîrekê ve girêdayiye?
Li berdanê negere; ma tu ji pîrekê
ve serbest bûyî? Li pîrekê negere.
28 Lê belê ger tu bizewicî, nabe
ku te guneh kiribe û ger keçikek
bizewice, nabe ku guneh kiribe.
Lê belê dê di bedenê de tengasi-
yên kesên ûsa çê bibin û ez dix-
wazim ku we ji van tengasiyan
biparêzim. 29 Ya birano, dix-
wazim vêya bibêjim: Dem teng
bûye! Ji niha ve pêv, bila yên
pîrekên wan hene, mîna tunebin û
30 yên digirîn, mîna nagirîn û yên
kêfê dikin, mîna ku nakin û yên
distînin, mîna ku malê wan tune-
bin 31 û yên ji dinê ve îstifade

1 Diqete.
2 Bila biqete.
3 Yanê, azad in.
4 Cîhanîna.
5 Hîn zêde wê bi kar bîne.
6 An jî: Bi berdêlekê hatin kirîn.

dikin, mîna ku heta ku tu bibêje
îstîfade nakin, bên xuya kirin; ji
ber ku rewşa dinê ya niha der-
bas dibe. 32 Lê belê dixwazim
ku hûn bêxem bin. Zilamê ku
nezewiciye, bi fikrandina Xu-
dan çawa xoşnûd bike, bona karê
Xudan xemê dikişîne; 33 lê belê
zilamê zewicî, bi fikrandina pîre-
ka xwe çawa xoşnûd bike difiki-
re, bona karê dinê xemê dikişîne
û bi vî awayî dibe du parî.
34 Pîrek an jî keçika nezewicî,
bi armanca him bi bedenî, him jî
bi ruhî pîroz bibe, bona karê Xu-
dan xemê dikişîne; lê belê pîre-
ka zewicî, bi fikrandina zilamê
xwe çawa xoşnûd bike, difikire
û bona karê dinê xemê dikişîne.
35 Û ez vêya, ne ku fitrakê[1] ba-
vêjim ser we; lê belê hûn di rewşek
ku li tê de bin û bila hişê we belav
nebe û hûn bi Xudan ve girêdayî
bimînin, bona qenciya we bi xwe
dibêjim

*Zewac li gor Zagonê ye*

Rom 7,2-3; Lûq 16,17-18

36 Lê belê ger kesek difikire ku
neheqiyan li keça xwe kiriye, ger
temenê keçikê derbas dibe û ze-
waca wê pêwist be[2], ew kes bila
xwesteka xwe bike, keça xwe bi-
zewicîne; nabe ku guneh kiribe.
37 Lê belê yê ne di bin hewceyê
de be, yê di dilê xwe de bi qirar û
bikare xwesteka xwe bîne cîh, di
dilê xwe de nezewicandina keça
xwe qirar bike, dê baş bike. 38 Û
bi vî awayî yê ku keça xwe bize-
wicîne, dê qenc bike û yê neze-
wicîne, dê hîn jî qenc bike.
39 Pîrekek heta ku zilamê wê bijî,
bi zilamê xwe ve girêdayî ye; lê
belê ger zilamê wê bimire, ew ji
zewaca kesê bi dilê xwe dixwaze
re serbest e; lê bila di Xudan de
be! 40 Lê belê ger ew mîna xwe
bimîne, li gor fikrê min dê hîn jî
dilxweş bibe û ez zen dikim ku
Ruhê Xwedê di min de jî heye.

*Goştên qurbanên ji Pûtan re tên pêşkêşkirin*

*Zanyarî ye, an hezkirin e?*

1.Kor 10,19-33; Rom 14,13-23

8 Lê belê ger em bên goştê
qurbanên ji pûtan re tên
pêşkêşkirin, em vêya dizanin:
Zanîna me hemûyan heye. Zanîn
qure dike, lê belê hezkirin geş
dike. 2 Ger kesek dibêje qey ez
tiştekî dizanim, hîn mîna ku divê
bizanibe, nizane. 3 Lê belê ger
kesek ji Xwedê hez dike, ew kes
ji aliyê wî ve tê zanîn.
4 Niha, ger em bên xwarina goştên
ku ji pûtan re tê pêşkêş kirin, em
dizanin ku, pût li dinê tiştekî tune
ye û ji yekê zêdetir Xwedê nîne.

[1] Kemendê.

[2] Lazim be.

5 Ji ber ku ger yên divê li erdê
be, an jî li ezman be, bi navê îlah
tên bang kirin hebin jî – herweha
gellek îlah û xudan hene – 6 lê
belê bo me tenê yek Xwedê Bavo
heye; ew bingeha her tiştî ye û
em bona wî ne û yek Xudan, Îsa
Mesîh heye; her tişt bi navgîniya
wî ne û em bi navgîniya wî ne.
7 Lê belê di hemû mirovan de ev
zanîn nîne; lê hin kes heta niha bi
hînbûyîna pûtê ve, wekî tiştekî
ku ji pûtê re hatiye qurban kirin
dixwin û ji ber ku ûcdanên wan
lawaz[1] e, gemarî dibe. 8 Lê belê
xwarin me ber bi Xwedê nabe, ji
ber ku ger em nexwin, tu kêmasiya
me nabe, ger em bixwin jî, tu
qezenca me nabe. 9 Lê belê bala
xwe bidinê ku, bila ev azadiya
we[2], bi awayekî ji lawazan re nebe
sedema xijbûnê! 10 Ji ber ku ger
kesek, te, yê ku xwediyê zanyariyê
ye, di pûtxanê de li sifrê rûniştî
bibîne, bona xwarina tiştên ku ji
pûtan re hatine qurban kirinê, ger
ew bi xwe lawaz be, ma dê ûcdanê
wî cesaretê nestîne? 11 Û bi vî
awayî, ev zilamê lawaz, ew birayê
ku Mesîh di oxra wî de miriye,
bona zanîna te dê helaq bibe!
12 Û bi vî awayî, li dijî birayan
bi guneh kirinê û ûcdanê wanî
lawaz birîndar kirinê, hûn ê li dijî
Mesîh gunehê bikin. 13 Ji ber vê
yekê, ger xwarinek bibe sedema
tilpekîbûna birayê min, bona ku
ez birayê xwe tilpekî nekim, ez
abadîn, tu carî goşt naxwim.

*Mafên Şagirtan*

Lûq 10,7; 1.Tîm 5,17-18

9 Ma qey ez ne azad im? Ma
qey ez ne şagirt im? Ma qey
min Xudanê me Îsa nedîtiye? Ma
hûn di Xudan de ne karê min in?
2 Ger ez bona kesekî din ne şagirt
jî bim, qet nebe, bona we şagirt
im; ji ber ku hûn di Xudan de
delîlên şagirtiya min in!
3 Ji yê min dikşînin pirsiyariyê
re parastina min ev e: 4 Ma qey
li xwarin û vexwarinê mafê me
nîne? 5 Ma mîna şagirtên din,
birayên Xudan û Kîfas, mafê me
nîne ku em pîrekekê[3] bawermend
bi xwe re bigerînin? 6 An ma qey
yê mecbûr in ku bişixulin tenê ez
û Barnabas in? 7 Ma kî bi mesrefa
xwe leşkeriyê dike? Ma kî rezê
diçîne û mêwê wê naxwe? An jî
ma kî kerî diçêrîne û ji şîrê keriyê
venaxwe? 8 Gelo ez vana li gor
dîtina mirovan dibêjim? An zagon
jî van tiştana nabêje? 9 Ji ber ku
di zagona Mûsa de hatiye nivîsan-
din: Devê gayê ku cêrê dike girê
nede[4]. Gelo Xwedê piştgirtiya

1 Zeîf, kêmhêz.
2 Rayadariya we.
3 An jî: Xwuşkekê.
4 (5.Mûsa 25:4)

gayan dike? 10 An jî, gelo ew bi
rastî vana ji bo me dibêje? Belê, ji
bona me hatiye nivîsandin; ji ber
ku divê yê ku cotê dajo, bi hêvî
bajo û yê ku cêrê dike jî divê bi
hêviya şirîkantiya bênderê cêrê
bike. 11 Ger me tovên ruhanî di
nava we de çandî be, qey em ji we
bênderek bûjenî biçînin, ma tiştek
mezin e? 12 Ger mafê kesên din
hebe ku ji we alîkariyê bistîne,
qey mafê me hîn zêde tune ye?
Lê belê me vî mafê xwe ji we ne-
xwest; lê bona ku em ji Mizgîniya
Mesîh re astengiyê dernexinin,
em baldirêjiyê ji her tiştî re dikin.
13 Ma qey hûn nizanin ku kesên ji
tiştên pîroz re xizmetê dikin, ji pe-
restgehê dixwin û yên li girûxanê
dişuxulin jî ji girûxanê ve par dis-
tînin? 14 Û bi vî awayî Xudan
tayîn kir ku, yên Mizgîniyê bang
dikin bila ji Mizgîniyê ve bijîn.

*Xelata min waz kirina Mizgîniyê ye*

2.Kor 11,7-12; 12,13-15; K.Şa 20,34-35; 1.Kor 10,24-33

15 Lê belê min qet yekî ji vana bi-
kar neanî û bona ku ji min re wusa
bête kirin jî, ez van tiştan nanivîsî-
nim; ji ber ku ger yek pesnvedana
min vala derxîne, ez bimirim ji bo
min qenctir e! 16 Lewma bona ku
ez Mizgîniyê waz dikim, bona min
pesnvedan nabe; ji ber ku ez di bin
hewcedariyekê de me; ji ber ku
ger ez Mizgîniyê waz nekim, wey
li min! 17 Ji ber ku ger ez vêya bi
xwestinê bikim, mişeya min heye;
lê belê ger bêxwestek be, dîsa we-
kalet ji min re hatiye emanet kirin.
18 Niha, mişeya min çî ye? Bona
ku rayedariya xwe yî di Mizgîni-
yê de ye, bi zêdeçûyînê ve bi kar
nînim, divê ez, dema Mizgîniyê
waz dikim, bê berdêl Mizgîniyê
pêşkêş bikim.
19 Ji ber, dema ku ez ji her kesî
azad bûm jî; bona ez hîn pirr kesî
qezenc bikim, xwe ji her kesî re ki-
rim dîl. 20 Û bona ku ez Cihûdan bi
dest bixim, ez bi Cihûdan re, mîna
Cihûdekî mijûl bûm; ez bi xwe ne
di bin zagonê de jî bûm, bona kesên
di bin zagonê de bi dest bixim, bi
wan re mîna ku ez jî di bin zagonê
de bim mijûl bûm; 21 ne kesekî
xwediyê zagona Xwedê, bi kesekî
di bin zagona Mesîh de bûna xwe,
bona kesê ku ne xwediyê zagonê ne
bi dest bixim, bi wan re mîna kesekî
ne xwedî zagon be mijûl bûm.
22 Bona bêhêzan bi dest bixim, bi
bêhêzan re bêhêz bûm; bi her awayî
bona ku hin kesî xelas bikim, bi her
kesî re bûm her tişt. 23 Û ez hemû-
yan bona Mizgîniyê çê dikim, da
ku, ez di wê de pardar bim.

*Bazdan û xelat*

2.Tîm 2,3-6; 4,5-8; Fîl 3,10-14; Îbr 12,1-3

24 Ma hûn nizanin ku, kesên di
qada bazdanê de her wekî hemû
baz didin, lê belê tenê yek kes xe-

latê digire? Ûsa baz bidin ku, bo
hûn wê bi dest bixin! 25 Her kesê
ku bona pêşbaziyê dixebite, di her
tiştî de nefsa xwe zeft dike. Ew,
bona çelengekî fanî rahêjin, lê belê
em bona ya ku ne fanî ye dikin.
26 Niha, ez mîna kesekî bê biryar
baz nadim, kulmika xwe mîna
li hewayê bixim bi valahiyê na-
vêjim[1]; 27 lê belê ez eziyetê didim
bedena xwe û wê dikim dîl; da ku,
piştî ji kesên din re wazê bikim, ez
bi xwe nême qewirandin[2].

*Dersên ku ji Dîroka Îsraêlê*
*ve bên stendin*

Zeb 78,13-33; 106,9-29; Îbr 3,7-19;
Rom 15,4

10 Ji ber ku ya birano, ez nax-
wazim ji we re nenas bimî-
ne ku bapîrên me hemû di bin ewr
de hatine parastin û hemû ji behrê
derbas bûne. 2 Û hemû di ewr û
behrê de ji Mûsa re hatin vaftîz
kirin. 3 Û hemûyan eynî xwarina
ruhanî xwarin 4 û hemûyan eynî
vexwarina ruhanî vexwarin; ji
ber, ji latê ku ji pey wan ve di-
hat vexwarin û ew lat Mesîh bû.
5 Lê belê Xwedê ji pirrên wan ne
razî bû; ji ber ku ew li çolê hatin
raxistin.
6 Û ev bûyeran, bona ku em mîna
wan tiştên xerab nexwazin ji me
re bibe ders çê bûn. 7 Mîna hinek
kesên ji wan, nebin pûtperest jî;
mîna ku hatiye nivîsandin: Gel
bona xwarin û vexwarinê rûniştin
û rabûn û leyîstin[3]. 8 Û em zinê
jî mekin; hinek kesên ji wan zîna
kirin û bîst û sê hezar kesên wan
di rojekê de ketin. 9 Û em Xudan
jî neceribînin; çawa ku hinekan ji
wan ceribandin û ji aliyê maran ve
hatin helaq kirin. 10 Û gotegotê jî
mekin; çawa ku hinekan ji wan
gotegotê kirin û ji aliyê yê helaq
dike ve hatin helaq kirin.
11 Û ev bûyeran, bona ji kesên
din re bibin ders hatin serê wan
û bona me yên gîhaştine dawiya
deman îkaz bike hatin nivîsandin.
12 Ji bo vê yekê, yê ku dibêje qey
ez li ser pêla me, bila xwe biparê-
ze ku, nekeve! 13 Hûn xeynî ce-
ribandina ya ku mirovî ye, rastî
yekî din nehatin; lê belê Xwedê
dilsoz e, destûrê nade ku hûn ji
hêza xwe zêdetir bên ceribandin;
lê belê bona ku hûn di berxwe de
bidin, bi ceribandinê re, dê rêya
derketinê jî ji we re temîn bike.

*Pût û sifra Xudan*

2.Mûs 20,4-5; 2.Kor 6,14-18;
Pey 2,14.20

14 Ji ber vê yekê, xoşewîstên
min, ji pûtperestiyê ve birevin!

---

1 An jî: Niha, ne bê biryar, ez wusa baz didim; ne mîna ku li hewayê xim, ez wusa kulmik dikim.
2 Red kirin.
3 Kêf kirin. (2.Mûsa 32:6)

15 Ez mîna ku ji kesên aqil-
mend re bêjim, dibêjim; hûn ji
gotinên min re daraziyê bikin[1]!
16 Ma kaseya pîroziyê, ya ku
em pîroz dikin[2], ji xwîna Mesîh
re ne parmendî ye? Ma nanê ku
em dişkînin, ji bedena Mesîh
re ne parmendî ye? 17 Ji ber ku
nan yek e, em jî bi pirrbûna xwe
bedenek in; ji ber ku, em hemû
nanekî par dikin. 18 Li gor be-
denê li Îsraêlê binihêrin! Ma yên
ku goştên qurbanê dixwin ne par-
darê girûxanê ne? 19 Ango ez çi
bibêjim? Ma taybetiyek qurbanê
pût heye? An jî girîngiyek pût
heye? 20 Na, lê kesên pûtperest
qurbanên xwe ne ji Xwedê re, ji
cinan re pêşkêş dikin! Û ez na-
xwazim ku hûn bi cinan re bibin
pardar. 21 Hûn nikarin ji kaseya
Xudan û ji kaseya cinan vexwin;
hûn nikarin ji sifra Xwedê û ji
sifra cinan re bibin pardar! 22 An
jî ma em bona çavnebariya Xu-
dan dişuxulin? Ma qey em ji wî
bihêztir in?

*Her tiştî bona bilindahiya Xwedê bikin*

1.Kor 8; Rom 14,13-23; 15,7

23 Her tişt ji min re serbest e, lê
belê her tişt ne bi fêde ye! Her
tişt ji min re serbest e, lê belê
her tişt ava nake[3]! 24 Bila her
kes çavnêriyê ne li fêda xwe,
lê belê li fêda kesên din bike.
25 Her tiştên ku li sûka qesaban
tê firotin, nekin pirsgirêka ûcdanî
û bêpirs û sewal bixwin. 26 Ji
ber ku: Rûyê erdê û tijîbûna wê,
yê Xudan in[4]. 27 Ger kesekî bê-
bawerî we bangî xwarinê bike û
hûn jî bixwazin biçin, tu tiştekî
nekin pirsgirêka ûcdanî û bê pirs
û sewal her tiştê ku li ber we
bête danîn bixwin. 28 Lê belê
ger yekî ji we re bibêje: Ev goştê
qurbanê ye! him bona kesên
vêya gotiye û him jî bona arami-
ya ûcdanê nexwin; ji ber ku rûyê
erdê û tijîbûna wê yê Xudan
in. 29 Dixwazim bibêjim ku ne
bona ûcdanê te, lê bona ûcdanê
yên din; ji ber ku çima azadiya
min ji aliyê ûcdanê kesên din ve
bê daraz kirin? 30 Ger ez bi şikir
kirinê beşdarî wê bibim, ji tiştê
ku min lê şikir kiriye, çima ez
bêm pekandin?
31 Bi kûrtî, hûn çi bixwin û ve-
xwin, hûn çi bikin, her tiştî bona
bilindahiya Xwedê bikin! 32 Ne-
bin sedema tilpekiya Cihûdan,
an Grekan, an jî Dêra Xwedê;
33 çawa ku ez jî ne li fêda xwe,
bona ku xelas bibin li fêda gellek
kesî digerim, di her tiştî de her
kesî xoşnûd dikim.

1 An jî: Biwezînin.

2 An jî: Ma kaseya bereketê, ya ku em bi bereket dikin...

3 Çêker, çêkirin.

4 Zebûr 24:1

*Pirsgirêka serî nixumandinê*

1.Kor 14,34-40; Ef 5,22-24; 1.Tîm 2,8-15

11 Mîna ku min Mesîh ji xwe
re mînak girtiye, hûn jî min
mînak bigirin! 2 Niha, bona ku
hûn di her tiştî de min di bîra xwe
de tînin û mîna ku min radestî we
kiriye, hûn bi hînkirinan ve digi-
rin, ez pesnê we didim. 3 Lê belê
ez dixwazim hûn bizanibin ku,
serê her zilamî Mesîh û serê pîrekê
zilam û serê Mesîh Xwedê ye.
4 Her zilamê ku serê xwe dixumî-
ne, dua dike, an jî peyxambertî
dike, serê xwe biçûk dixîne. 5 Lê
belê her pîreka ku ser vekirî dua
dike, an jî peyxambertî dike, serê
xwe biçûk dixîne; ji ber ku bi ser
kur kirinê re yek û eynî tişt e! 6 Ji
ber ku ger pîrek xwe nexumîne, bila
porê wê jî bête jêkirin; lê belê ger
kurkirin, an jî por jêkirina pîrekê
şerm be, bila serê xwe bixumîne.
7 Divê zilam serê xwe nexumîne;
ji ber ku zilam di mînakiya Xwedê
de ye û bilindahiya Xwedê ye; lê
belê pîrek bilindahiya zilam e. 8 Ji
ber ku zilam ne ji pîrekê, lê belê
pîrek ji zilam e. 9 Ji ber ku zilam
jî ne ji bona pîrekê, lê belê pîrek
ji bona zilam hate afirandin. 10 Ji
ber vêya ji ber sedema milyaketan
pîrek, divê li ser serê xwe bibe
xwediyê nîşana serweriyê.
11 Tevî vêya, di Xudan de ne
pîrek bê zilam, ne jî zilam bê
pîrek e. 12 Ji ber, mîna ku pîrek
ji zilam ve afiriye, zilam jî bi nav-
gîniya pîrekê ve dibe; lê belê her
tişt ji Xwedê ye. 13 Hûn bi xwe
qirar bidin; ma bê nuxumandin
dua kirina pîrekê ji Xwedê re li
cîh e? 14 Ma gelo xweza[1] jî hînî
we nake ku, pordirêjiya zilam
bona wî bêhurmetî ye? 15 Lê belê
pordirêjiya pîrekê, ji wê re bilin-
dahî ye; ji ber ku por, mîna rûbe-
rekî ji wê re hatiye dayîn. 16 Lê
belê ger kesek bixwaze ku têkeve
keftûleftê, kevneşopek me yî ûsa
nîne, ne jî ya Dêrên Xwedê heye.

*Şîretên di derheqê sifra Xudan de*

Lûq 22,119-20; 1.Kor 10,16-17;
1.Sam 2,12-17

17 Lê belê ez bi temmî kiri-
na vêya, pesnê ne bona ya hîn
jî qenc, lê bona ya hîn jî xerab
bicivin, nadim. 18 Ji ber ku ya
yekemîn, dema hûn di Dêrê de
tên cem hev, ez dibihîzim ku di
nava we de cihêtî[2] hene û ez pa-
riyek jî bi vêya bawer im. 19 Ji
ber, bona ku di nava we de yên
meqbûl xuya bibin, divê di nava
we de veqetandinan[3] çê bibin!
20 Niha, dema hûn li cîhekî dici-
vin, hûn bona beşbûna sifra Xu-

1 Tabîet.
2 Firqatî, cudayî.
3 Firqe, partîvanîtî.

dan nacivin; 21 ji ber ku her yek,
li benda yê din nasekine û xwa-
rina xwe dixwe û hinek kes birçî
dimînin, hinek kes jî serxweş di-
bin. 22 Ma bo xwarin û vexwa-
rinê malên we tune ye? An jî ma
hûn Dêra Xwedê biçûk dibînin û
dixwazin yên xwarina wan nîne
bişermînin? Ma ez ji we re çi bi-
bêjim? Ma ez pesnê we bidim? Di
vêya de pesnê we nadim!
23 Ji ber ya ku min radestî we ki-
riye[1], ji Xudan stendim; şeva ku
Xudan Îsa dan dest, nan rahişt
24 û piştî ku şikir kir, şikand[2] û
got: Bigirin, bixwin! Vêya be-
dena minî ya ji bo we tê şikestin
e[3]; vêya bona bîranîna min bikin!
25 Mîna vêya paşî xwarinê kasê
jî rahişt û got: Ev kaseya pey-
mana nû ya di xwîna min de ye;
dema ku her car we vexwar, bona
bîranîna min vêya bikin! 26 Ji ber,
dema we her ku ji vî nanî xwar û
ji vê kasê vexwar, heta ku ew bi
xwe were, hûn bangewaziya miri-
na Xudan dikin.
27 Bo vê yekê her kî ku bi şiklekî
ne liyaq e nan bixwe, an jî ji ka-
seya Xudan ve vexwe, li dijî be-
den û xwîna Xudan sûcdar dibe.
28 Lê belê bila mirov xwe bi xwe
biceribîne û bi vî awayî nan bix-
we û ji kasê[4] vexwe. 29 Ji ber ku
yê dixwe û vedixwe, ger bedenê
seh neke, dê li dijî xwe daraziyê
bixwe û vexwe. 30 Ji ber vê yekê
gellekên ji we lawaz û nexweş in
û gellek kes jî radikevin[5]. 31 Lê
belê ger me xwe bi xwe daraz
bikirana, em ne dihatin daraz ki-
rin. 32 Lê belê gava ku em bên
darazkirin, bona ku em bi dinê re
nebin mehkûm, Xudan me per-
werde dike.
33 Ji ber vê yekê, birayên min,
dema hûn bona xwarinê hatin cem
hev, li benda hev bin! 34 Ger kesek
birçî be, bila di mal de bixwe; da
ku, hûn ji bona darazkirinê necivin.
Û tiştên ku şunda mane, wexta ku
ez bêm, ez ê wan çareser bikim.

*Xelatên Ruhanî*

Rom 12,6-8; 1.Pêt 4,10-11

12 Ya birano, dema em bên
xelatên ruhanî, ez naxwa-
zim ku hûn di vê babetê de nezan
bimînin. 2 Hûn dizanin ku, dema
hûn pûtperest bûn, bi vî awayî an
jî bi wî awayî ji rê derketibûn û
berê we dabûn peristina pûtê bê-
ziman. 3 Bo vê yekê ez dixwa-
zim ku hûn vêya zanibin: Tu kesê
ku bi navgîniya Ruhê Xwedê ve
diaxife nabêje: Nalet li Îsa be! Û
bêyî navgîniya Ruhê Pîroz jî tu
kes nikare bibêje: Îsa Xudan e!

---

[1] Teslîmê we kiriye.
[2] Parî kir, an jî: Perçe kir.
[3] Bedena minî ya ji bo we ye, an jî: Bedena minî ya di oxra we de feda dibe ye.
[4] Tas, kasik.
[5] Raketine, mirine.

4 Û xelatên ruhanî tewr bi tewr
hene, lê belê eynî Ruh e. 5 Û wezî-
feyên tewr bi tewr hene, lê belê
eynî Xudan e. 6 Û karên tewr bi
tewr hene, lê belê yê di her kesî de
her tiştî dişixulîne eynî Xwedê ye.
7 Lê belê bona qenciya hevpişka
her kesî, hunerek Ruh eşkere
bike, ji her kesî re tê dayîn. 8 Ji
ber ku bi navgîniya Ruh, ji yekî
re hunera gotina peyvên zaniyarî
û ji bona yekî din li gor eynî Ruhî
hunera gotina peyvên zaneyî,
9 ji yekî din re bi eynî Ruhî ba-
werî û ji yekî din re bi eynî Ruhî
xelatên şîfayê û 10 ji yekî din re
hêza çêkirina kerametan û ji yekî
din re peyxambertî kirin û ji yekî
din re, ruhan ji hev veqetandin, ji
yekî din re cûr be cûr zimanan û
ji yekî din re jî hunera wergeran-
dina zimanan dide. 11 Lê belê yê
ku vana hemûyan dişuxulîne yek
û eynî Ruh e; ji her kesî re, li gor
xwestina xwe cuda bi cuda[1] belav
dike.

*Beden yek û endamên wê gellek in*

Rom 12,4-8; Ef 4,4-7; Fîl 2,14

12 Ji ber mîna ku beden yek û en-
damên wê gellek in, herwekî hemû
endamên bedenê gellek in, lê be-
den yek e; Mesîh jî ûsa ye. 13 Ji
ber ku dixwaze bila Cihûd be, di-
xwaze Grek, dixwaze dîl, dixwaze
azad bibin, em hemû bona bûyîna
bedenekî di eynî Ruhî de vaftîz bûn
û ji me hemûyan re ji yek Ruhî ve
dan vexwarin. 14 Ji ber ku beden jî
ne tenê ji endamekî, lê belê ji gel-
lek endaman e. 15 Ger ling bibêje:
Ji ber ku ez ne dest im, ez ne aidê
bedenê me! Ji ber vê yekê ma ew
ne aidê bedenê ye? 16 Û ger guh
bibêje: Ji ber ku ez ne çav im, ez ne
aidî bedenê me! Ji ber vê yekê ma
ew ne aidê bedenê ye? 17 Ger hemû
beden çav ba, dê bihîstin li ku derê
bimaya? Ger gişt guh ba, dê bêhn-
kirin li ku derê bimaya? 18 Lê belê
Xwedê, niha her endamên bedenê,
li gor xwestina xwe di bedenê de bi
cîh kiriye. 19 Û ger hemû endamek
biba, dê beden li ku derê bimaya?
20 Lê belê niha endam gellek in,
lê belê tenê bedenek heye. 21 Û
çav nikare ji dest re bibêje: Hewca
min ji te nîne! An jî serî ji lingan
re nikare bibêje: Hewca min ji we
re nîne! 22 Lê belê hîn jî bi zêdeyî,
endamên bedenê yên hîn jî lawaz
xuya dibin, pêwist in. 23 Û em hîn
zêde qîmetê didin endamên bedenê
yên hîn jî qîmet kêm dihesibînin û
endamên me yî bêrewnaq hîn jî
birewnaq dibe; 24 ji ber ku hewca
endamên me yî birewnaq ji pûteyê[2]
nîne. Lê belê Xwedê hîn jî qîmet
da yên qîmet kêm û di bedenê de
yekitiyê bi dest xist; 25 da ku, bila

1 An jî: Yek bi yek.

2 Îhtimam.

di bedenê de cihêtî çênebe, lê belê
endaman bi wekhevî çavnêriyê li
hev û din bikin. 26 Û ger enda-
mek êşê bikşîne, hemû endam pev
re êşê dikşînin û ger endamek bê
bilind kirin, hemû endam pev re
kêfxweş dibin.
27 Lê belê hûn bedena Mesîh û
cuda cuda endamên wê ne[1]. 28 Û
Xwedê di Dêrê[2] de hinekan, pêşiyê
şagirtan, bi duwemînî peyxambe-
ran, bi sêwemînî mamosteyan, pişt
re karên biqudret, pişt re xelatên
şîfayê, alîkariyan, rêvebiriyan,
celebên zimanan danî. 29 Ma hemû
şagirt in? Ma hemû peyxamber in?
Ma hemû mamoste ne? Ma hemû
dikarin karên biqudret bikin?
30 Ma xelatên şîfayê, yên hemû-
yan hene? Ma hemû dikarin bi
zimanan ve biaxifin? Ma hemû
dikarin wergerînin? 31 Lê belê
hûn xelatên hîn jî serete bi xîret
bixwazin. Û dîsa ez rêyek hîn qenc
nîşanî we bidim.

*Helbesta evînê*
Met 22,36-40; Kol 3,14;
1.Yû 3,11-19; 4,7-12; Ef 5,1-2

13 Ger ez bi zimanê mirovan
û milyaketan biaxifim, lê
belê hezkirina min tune be, ez ê
bibim mîna sifira deng derdixe, an
jî mîna zîla dikute. 2 Ger peyxam-
bertiya min hebe û hemû hem-
rêzan û hemû zanistiyan zanibim
û ger hemû baweriya minî qasî
çiyan ji cîh bihejîne hebe, lê belê
hezkirina min tune be, ez tuneyi-
yek im. 3 Û ger hemû malên xwe
bi sedeqeyî belav bikim û ger be-
dena xwe bona şewitandinê bidim
dest, lê belê hezkirina min tune
be, tu fêda vêya ji min re nabe!
4 Hezkirin pirr bisebr e û dilovan
e[3]; hezkirin çavnebariyê nake;
hezkirin pesnê xwe nade, quretiyê
nake; 5 bi hovîtiyê nake, li men-
faeta[4] xwe nagere, hêrs nabe, xe-
rabiyê bi bîr nayne; 6 bi neheqiyê
kêfxweş nabe, lê belê bi rastiyê ve
dilxweş dibe; 7 baldirêjiyê li her
tiştî dike, bi her tiştî bawer dibe,
her tiştî hêvî dike, ji her tiştî re
sebir dike.
8 Hezkirin tu carî dawî nabe; lê
belê dê peyxambertî ji navendê
rabin; dê ziman biqedin; zanîn
ji navendê rabin. 9 Ji ber ku em
hindik[5] dizanin, hindik peyxam-
bertiyê dikin. 10 Lê belê dema yê
kamil[6] bê, dê yên bisînor ji naven-
dê rabin. 11 Ez dema zarok bûm,
mîna zarokan diaxifîm, mîna za-
rokan fêhm dikirim û mîna za-
rokan difikirîm; dema ez bûm
zilamek, min dev ji van mijûli-
yên zarokayî berda. 12 Ji ber ku

[1] Yanê, endamên bedenê ne.
[2] Civaka bawerkiran.
[3] Bişefqet e.
[4] Xirwebaziya, feyde.
[5] Kêm, piçek.
[6] Gihiştî, mukemel, bêqisûr.

em niha her tiştî mîna diyariyek
nîvwindayî ya mirêkê[1] dibînin,
lê belê wê demê em ê rû bi rû bi-
bînin; niha zanîna min bisînor e,
lê belê wê demê mîna ku ez têm
zanîn ez ê bizanibim. 13 Lê niha,
bawerî, hêvî, hezkirin dimînin û ji
vana yê herî mezin[2] hezkirin e.

*Zimanên nayên zanîn û peyxambertî*
1.Kor 12,4-7; Rom 14,19; 1.Sel 5,11;
Ef 4,12

14 Li pey hezkirinê baz bi-
din; lê belê xelatên ruhanî,
bi taybetî peyxambertî kirinê bi
xîret ve bixwazin! 2 Ji ber ku yê
bi zimanan ve diaxife, ne ji miro-
van re, lê ji Xwedê re diaxife; ji
ber ku kes fêhm nake; lê ew bi ruh
ve hemrazan[3] dibêje. 3 Lê belê yê
peyxamberiyê dike, bona ava ki-
rinê, teşwîq kirinê û xemrevînî,
ji mirovan re diaxife. 4 Yê ku bi
ziman ve diaxife, xwe bi xwe ava
dike; lê belê yê ku peyxamberiyê
dike, Dêrê ava dike. 5 Niha, ez
dixwazim ku, hûn hemû bi zima-
nan ve biaxifin, lê belê hîn zêde
dixwazim ku hûn peyxamberiyê
bikin. Ji ber, hata ku ev zimanana
bona Dêrê neyên wergerandin,
kesê ku peyxamberiyê dike, ji
kesên bi van zimanan ve diaxife
mezintir e.
6 Lê belê niha, ya birano, ger
ez bi zimanan gotinê ve werim
cem we û ger ez bi peyxamê, an
bi zanînê, an bi peyxambertiyê,
an jî bi hînkariyê ve ji we re ne-
bêjim, dê çi qenciya min ji we
re çê bibe? 7 Heta tiştên bêcan
yên mîna bilûr û çenkê dengên
guhêrbar dernexin, kî fêhm dike
ku bi bilûr û çenkê çi tê lêxistin?
8 Ji ber ku ger borîjen jî dengekî
nenas bide, ma kî ji şer re amade
dibe? 9 Mîna vêya, ger hûn jî bi
zimanekî fehmbar neaxifin, dê
gotinên we çawa bêne fêhm ki-
rin? Wê gavê axaftina we berhe-
wa ye! 10 Bê şik li dinê gellek
tewr deng hene û yek jî ne bê
mane ye. 11 Niha, ger ez maneya
deng fêhm nekim, ez ê ji bo yê
ku diaxifî bibim xerîb[4] û yê ku
diaxife dê ji bo min bibe xerîb.
12 Bi vî awayî, madem ku hûn jî
ji xelatên ruhanî ve bixîret in, ji
bona pêş ve birina Dêrê, li zêde-
bûna xwe bigerin.
13 Ji bo vêya, kesê bi ziman ve
diaxife, bila bona wergerîna go-
tinên xwe dua bike. 14 Ji ber, dema
ez bi ziman ve dua bikim, ruhê
min dua dike, lê belê hişê min bê
berdar e. 15 Niha, divê çawa be?
Ez ê bi ruh dua bikim û bi hiş jî
dua bikim; bi ruh qesîda bibêjim û

1 Eynikê.
2 Sereta, bilind.
3 Sir.
4 Nenas.

bi hiş jî qesîda bibêjim. 16 Ger tu
tenê bi ruh ve şikiryê bînî, yekî ji
gel, ji ber ku gotina te fêhm nake,
dê çawa ji dua şukranê ku te kiriye
re: Amîn! bibêje? 17 Ji ber, dibe
ku tu qenc şikiryê bikî, lê belê yê
din nayên ava kirin. 18 Bona ez ji
we hemûyan pirrtir bi zimanan ve
diaxifim, ji Xwedê re şikir dikim.
19 Lê belê heta ku ez di Dêrê de
di zimanekî de deh hezar gotinî
bibêjim, bona kesên din perwer-
de bikim di hişê xwe de axaftina
pênc gotinî çêtir digirim.
20 Birano, di fêhmkirinê de nebin
zarok; lê di babeta xerabiyê de
bibin mîna zarokan, lê belê di ra-
manên xwe de mîna kesên gîhaştî
bibin. 21 Di zagonê de hatiye ni-
vîsandin:
Xudan dibêje[1]: Bi navgîniya kesên
zimanê xerîb diaxifin û bi lêvê xe-
rîban ez ê bangî vî gelî bikim û dê
dîsa jî min guhdarî nekin!
22 Ji ber vê yekê, axaftina bi zi-
manan ne bona bawermendan, lê
bona bêbaweriyan nîşanek e; lê
belê peyxambertî ne bona bêba-
weriyan, lê bona bawermendan e.
23 Ger niha hemûya Dêrê li cîhekî
bên cem hev û dema hemû pev re
bi zimanan ve biaxifin û yekî ba-
weriyê neaniye, an jî yekî ji gel
têkeve nava wan, dê nebêjin: Hûn
har bûne? 24 Lê belê ger dema
hemû peyxamberiyê bikin û yekî
bawerî neaniye, an jî yekî ji gel
têkeve nava wan, bi her gotinên
ku tê gotin dê bê qanih kirin û bê
daraz kirin 25 û dê ramanên dizî
yên dilê wî bê eşkere kirin û bi
vî awayî dê ew bibêje: Bi rastî jî
Xwedê di nava we de ye û ser rû
xwe bavêje erdê û ji Xwedê re pe-
ristinê bike.

*Bila her tişt bi rastî û bi rêzî bê çêkirin*

Kol 2,5; 1.Tîm 2,12-15; 1.Pêt 3,1-6

26 Niha çî ye, birano? Dema hûn
dicivin, Zebûrek her yekî heye,
hînkirina wî heye, peyxama wî
heye, zimanê wî heye, wergera
wî heye. Bila her tişt bona ava
kirinê be! 27 Ger kesek bixwaze
bi zimanekî biaxife, bila dudu, an
herî zêde sê kes bi dor biaxifin û
yek jî bila yên tê gotin wergerîne.
28 Lê belê ger werger tune be,
bila ew di Dêrê de bê deng bimî-
ne û di hundirê xwe de bi Xwedê
ve biaxife. 29 Û bila du an jî sê
peyxamber bibêjin û bila yên din
daraziyê bikin[2]. 30 Lê belê ger
peyxamek bê kesekî li wê derê
rûniştiye, bila yê yekemîn bêdeng
bisekine. 31 Ji ber ku hûn hemû
dikarin yek bi yek peyxamberi-
yê bikin, da ku, hemû hîn bibin
û hemû bên teşwîq kirin. 32 Û
ruhên peyxamberan bengî pey-

[1] Îşaya 28:11-12

[2] Ji hev cihê bikin, an jî: Baş biwezinîn in.

xamberan in[1]. 33 Ji ber ku Xwe-
dê ne yê tevliheviyê, lê Xwedanê
dilxweşiyê ye; mîna di hemû
Dêrên pîrozan de ûsa ye. 34 Bila
pîrekên we[2] di Dêran de bê deng
bimînin; ji ber ku ji axaftina wan
re destûr nîne; mîna ku zagon jî
dibêje, bila bengî bin. 35 Û ger
tiştekî ku bixwazin hîn bibin,
bila li malê ji zilamê xwe bipir-
sin; ji ber ku di Dêrê de axaftina
pîrekan şerm e. 36 An ma gotina
Xwedê ji we derket? An jî tenê
gîhaştiye we?
37 Ger kesek xwe peyxamber, an
jî ji aliyê ruh ve gihaştî zanîbe,
bila bizane ku yên min ji we re ni-
vîsandiye emirên Xudan in. 38 Lê
belê ger kesek nezan be, bila ne-
zan be! 39 Ji ber vê yekê, birayên
min, peyxambertî kirinê bi xîret
bixwazin û nebin astengê axafti-
na bi zimanan. 40 Lê belê bila her
tişt bi rastî û bi rêzî bê çêkirin!

*Girîngiya vejîna Mesîh*

Met 28; Marq 16; Lûq 24; Yû 20; K.Şa 1,3

15 Ya birano, dixwazim ku
Mizgîniya min agahî we
kir û we jî qebûl kir û pê ve dil-
soz mane[1] di bîra we de bînim;
2 ger hûn bi gotina ku min ji we
re mizgîn daye ve zexm bigirin,
hûn ê bi navgîniya wê xelas bi-
bin; dijberî wê divê we bi valahi-
yê bawerî anî be.
3 Ji ber ku berî her tiştî yê ku min
girt, têgihandim we[4]: Ûsa ku, li
gor Nivîsên Pîroz Mesîh, ji bona
gunehên me mir û 4 hate binerd
kirin û li gor Nivîsên Pîroz, roja si-
siyan vejiya 5 û ew ji Kîfas re, pişt
re ji Donzdehan re xuya bû. 6 Da-
wiyê di carekî de xuyayî pênc sedî
zêdetir birayan bû; gellekên wan
hîn dijîn, lê belê hinekan jî mirin.
7 Li pey vêya xuyayî Aqûp, pişt
re ji hemû şagirtan re 8 û dawîna
dawîn xuyayî min, yê mîna zaroyê
bê dem bûyiye jî bû. 9 Ji ber ku ez
herî biçûkê şagirta me; ez ne liyaq
im ku bi şagirtiyê bême bang kirin;
ji ber ku min tahdê li Dêra Xwedê
kir. 10 Lê belê ez her çi bim, bi ke-
rema Xwedê ez ew im û kerema
wî ya bona min bi valahiyê neçû;
lê belê ji wan hemûyan zêdetir xe-
bitîm; lê ne ez, tenê kerema Xwe-
dê ya bi min re ye. 11 Niha divê ez
û divê ew, em wusa waz dikin û
we wusa bawerî anî.

*Dê mirî bivejin*

2.Tîm 2,8; 2,16-18; Lûq 20,27-38;
Rom 6,4-11; 1.Pêt 1,3-5; 1.Sel 4,13-18

12 Lê belê ger vejîna Mesîh ya ji
mirinê tê waz kirin, çawa dibe ku
hin kesên ji nava we dibêjin, vejî-

1 An jî: Di bin dageriya peyxamberan de ye.
2 An jî: Bila pîrek.
3 An jî: Di wê de sekinîne.
4 Teslîmê we kirim.

na miriyan tune? 13 Lê belê ger
vejîna miriyan tune be, Mesîh jî
nevejiya ye! 14 Û ger Mesîh ne-
vejiya be, waza me vala, baweriya
we jî vala ye! 15 Û şahdeyiya me
yî di derheqê Xwedê de jî dibe ku
derew bibe; ji ber, me şahdeyiyê
kirin ku Xwedê Mesîh ji mirinê
ve vejand; ger bi rastî mirî neveji-
yabin, dibe ku wî ew jî nevejandi-
ye. 16 Ji ber ku ger mirî navejin,
Mesîh jî nevejiya ye. 17 Û ger
Mesîh nevejiya be, baweriya we
vala ye; hûn hîn di nava gunehên
xwe de ne. 18 Li gor vêya yên bi
aidbûnê Mesîh ve mirine jî helaq
bûne. 19 Ger tenê bona vê jiyana
me hêviya xwe bi Mesîh ve girê-
da be, em ji her kesî zêdetir kesên
belengaz in!
20 Lê belê niha Mesîh, bi mînak-
bûna kesên miriye yê pêşîn ji mi-
rinê ve vejiya ye. 21 Ji ber ku li
gor mirin bi navgîniya mirovekî
hat, ji mirinê vejîn jî bi navgîni-
ya mirovekî bû. 22 Ji ber ku her
kes çawa di Adem de dimire, bi
vî awayî dê her kes di Mesîh de
bigihêje jiyanê. 23 Lê belê her
kes dema dora wan bê dê bivejin:
Mînaka pêşînbûnê Mesîh, dawiyê
di hatina wî de yên aidî Mesîh in.
24 Paşê, dema ew her rêvebiriyê
û her hikumraniyê û her qudretê
ji navendê rake, serweriyê bide
Bavo Xwedê, dê dawî bibe. 25 Ji
ber, heta ku ew hemû neyarên wî
li bin lingê wî raxe, divê ew ser-
weriyê bajo. 26 Dijminê herî da-
wiyê ji navendê bê rakirin mirin e.
27 Ji ber ku: Hemû tiştan danî bin
lingên wî[1]. Lê belê dema bêje: Her
tişt bengî wî hatine danîn, eşkere
ye ku yê her tiştî bengî wî kiriye,
ciyawaz e[2]. 28 Û dema her tişt bi
wî ve bête bengî kirin, wê demê
dê Law bengî yê ku her tiştî bengî
wî kiriye, bibe; da ku, bila Xwedê
di her tiştî de her tişt bibe.
29 Ya na, dê yên bi navê miriyan
vaftîz bûne çi bibin? Ger mirî tu
carî nevejiyabin, mirovan çima bi
navê miriyan vaftîz dibin? 30 Û
em bo çi xwe her demjmêrî[3] davên
talûkan? 31 Ya birano, ji bona we
bi heqê wê pesnvedana ku ez di
Xudanê me Mesîh Îsa de xwediyê
wê me, her roj dimirim! 32 Ger
li Efesê, bi mirovî, bi cenawiran
re cengê kiribim, çi qenciya vêya
ji min re heye? Ger mirî nevejin;
em ê bixwin û vexwin, ji ber ku
em ê sibê bimirin! 33 Nexapin:
Hevaliyên xerab xûyê qenc xera
dikin! 34 Bi rastî şiyar bibin[4] û
gunehan mekin! Ji ber ku di hine-
kan de zanîna Xwedê nîne; bona
ku hûn bişermin ez vêya dibêjim.

[1] Zebûr 8:6
[2] Danisqe ye.
[3] Saet.
[4] Bi rastî li xwe bihesîn.

*Bedena paşî vejînê*

Fîl 3,20-21; 1.Yû 3,2-3; 2.Kor 5,1-9

35 Lê belê yek dikare bibêje ku:
Dê mirî çawa bivejin û dê bi be-
denekî çawa bên? 36 Ya bêaqil,
heta ku tiştê te çandiye nemire,
naveje!
37 Û dema tu biçîne, tu reha
ku bê nîne, tenê tovê wê, tovê
genim an jî tovê riwekî din diçînî.
38 Lê belê Xwedê li gor xwestina
xwe bedenê dide wê û ji her tovê
bedenek taybetî dide. 39 Her goşt
ne wekhev e; lê belê goştê mirovan
tewrek û goştê heywanan tewrek
û goştê masî û civîkan jî tewrek e.
40 Bedenên semawî hene û bede-
nên dinyayî hene; lê belê rewna-
qiya yên semawî tewrek û yên
dinyayî tewrek e. 41 Rewnaqiya
rojê tewrek û rewnaqiya heyvê
tewrek û rewnaqiya stêrkan tewrek
e; ji ber ku di rewnaqiyê de stêrk ji
stêrkê cihêtir e.
42 Vejîna miriyan jî ûsa ye. Di
rizandinê de tête çandin û di ne-
rizandinê de tête vejandin; 43 di
bêhurmetiyê de tête çandin û di
bilindahiyê de tête vejandin; di la-
waziyê de tête çandin û di qudretê
de tête vejandin; 44 bi bedenekî
xwezabûnê tê binerd kirin û bi be-
denek ruhanî ve tê vejandin. Mîna
ku bedena xweza heye, bedena
ruhanî jî heye. 45 Ûsa jî hatiye ni-
vîsandin: Mirovê yekemîn Adem,
bû canê ku dijî[1]. Ademê dawîn[2] bû
ruhek divejîne. 46 Lê belê pêşiyê
ne yê ruhanî, lê yê xweza hat; yê
ruhanî dawiyê hat. 47 Mirovê
pêşîn ji erdê, yanê ji axê ye; mi-
rovê duwemîn Xudanê ji ezmana
ye. 48 Yê ji axê ve çawa be, yên
ji axê ne jî ûsa ne û yê ezmanan
çawa be, yên ezmanî[3] jî ûsa ne.
49 Û çawa ku me sûretê yê erdê
kişandiye, em ê sûretê yê ezmanî
jî bikişînin. 50 Lê belê ya birano,
ez vêya bibêjim, goşt û xwîn ni-
kare Serweriya Xwedê bi mêrasî
bigire; yên dirizên jî nikarin neri-
zandinê bi mêrasî bigirin.

*Bawermend tên guhertin, serfiraziya li dijî mirinê*

1.Sel 4,13-18; Fîl 3,20-21; 2.Tîm 1,10; Rom 5,12-21

51 A vay, ez razekê[4] ji we re
dibêjim: Em ê gişt di xew de
neçin, lê belê di dema borîjêna
dawîn de, em ê hemû nişka ve, di
çavşikanînkê de bêne guhertin;
52 ji ber ku dê borîjên bê pifkirin
û dê mirî bi nerizandinê ve bivejin
û em ê bên guhertin. 53 Ji ber ku
divê ev ê dirize bêrizandinê û ev
ê bimirinî jî bêmiriniyê li xwe ke.
54 Lê belê dema ev yê ku dirize,

---

1 (1.Mûsa 2:7)
2 Ademê dawîn, Îsa Mesîh e.
3 Semawî.
4 Sir.

nerizînê li xwe bike û ev yê ku
dimire, bêmiriniyê li xwe bike,
kelama ku hatiye nivîsandin dê
wê çaxê bête cîh[1]: Mirin di ser-
firaziyê de hate daqurtandin!
55Ya mirin, serfiraziya te li ku
derê yî?
Ya mirin, kelemê te li ku derê yî[1]?
56 Kelemê mirinê guneh e û hêza
guneh zagon e. 57 Lê belê bila ji
Xwedê re şikir be, wî bi navgîni-
ya Xudanê me Îsa Mesîh serfira-
zî[3] daye me!
58 Bo vê yekê birayên minî
xoşewîst, bi zanîna ku keda we
di Xudan de ne vala ye, pêdandî,
bêhejîn[4] û her tim di karê Xudan
de li ser zêdebûnê bin!

*Şîretên di derheqê alîkariya ji bo Pîrozên Orşelîmê de*

2.Kor 8 û 9; Rom 15,25-27

16 Niha dema em bên berhev
kirina alîkariya ku dê ji
pîrozan re bibe: Hûn jî vêya, çawa
ku min ji Dêrên Galatiyan re tem-
mî kiriye, wusa bikin. 2 Her yekî
ji we roja heftê ya yekemîn, bila
li gor qezenca xwe hinek pere
hilîne û bicivîne; da ku, dema ez
bêm, bila wê gavê berhevkirin ne-
bin. 3 Û dema ez bêm wir, bona
bexşandinê we bibe, kesên ku hûn
munasib dibînin, ez ê wan tevî na-
meyan bişînim Orşelîmê. 4 Û ger
çûna min jî hewce bike, ew dê bi
min re biçin.

*Xwestinên Pawlos yên şexsî*

1.Sel 5,5-13

5 Lê belê gava ji Makêdonê ve
derbas bûm pêv, ez ê bêm cem
we; ji ber ku di Makêdonê de
derbas dibim. 6 Lê belê divê ez li
cem we bimînim, an jî zivistanê
biborînim; da ku, ez her bi ku ve
biçim, hûn min bişînin[5]. 7 Ji ber
ku ez naxwazim we ûsa bi kurtayî
bibînim û derbas bibim; lê ger
destûra Xudan bibe, ez hêvî dikim
ku ez ê demekî li cem we bimînim.
8 Lê belê heta Pêntîkostê ez ê li
Efesê bimînim; 9 ji ber ku ji min
re deriyekî mezin û bi tevgerê ve
tijî vebû û yên ku li dijî disekinin
zehf in.
10 Û ger dema Tîmotêyos were,
bala xwe bidinê ku bila ew li cem
we, bi bêtirsî bimîne; ji ber ku ew jî
mîna min karê Xudan dike. 11 Bila
kes wî xor nebîne! Lê belê bona
bête cem min, wî bi dilxweşiyê ve
bi rê bikin; ji ber ku ez tevî birayan
li benda hatina wî me.
12 Dema em bên birayê me Apol-
los, bona bi birayan ve bê cem we
min gellek rica ji wî re kir û niha
ji hatinê re qet xwastina wî tune;

---

1 Îşaya 25:8
2 Hoşeya 13:14
3 Zafer.
4 Nalerize, pêdandî.
5 Min bi rê bikin.

lê belê dema fersendekî bi cîh bi-
bîne, dê were.
13 Hişyar bimînin, di baweriyê de
pêdandî[1] bin, bi mêranî bin! 14 Bila
her tiştên we bi hezkirinê ve bibe!
15 Hûn bi maliyên Stêfanosê
Ahayayê nûber e û bona xizme-
ta ji pîrozan re xwe tirxan kirine
ve dizanin; 16 ya birano, ez li ber
we digerim, bengî yê mîna viya û
hemûyên bi vana re dişuxulin û
kedê didin bin. 17 Û ez bi hatina
Stêfanos û Fortunatos û Ahaykûs
ve kêfxweş dibim; ji ber ku tu-
neyiya we vana ji bîra min birin.
18 Ji ber ku aramiyê dan ruhê min
û yên we; ji ber vê yekê yên mîna
vana binasin!
19 Dêrên Asyayê silavê li we
dikin. Akvîla û Prîska, bi Dêra
ku li mala wan dicive, ji we re
di Xudan de gellek silavan dikin.
20 Hemû bira ji we re silav di-
kin. Ji hev û din re bi ramûsana
pîroz ve silav bikin!
21 Bi destê xwe, silava min, Paw-
los. 22 Ger kesek ji Xudan hez
neke, bila bi nalet bibe! Marana-
ta[2]! 23 Bila xêra[3] Xudan Îsa bi
we re be! 24 Bila hezkirina min
di Mesîh Îsa de bi we hemûyan re
be! Amîn.

---

1 Sabît, pêdandî.
2 Di maneya: Xudanê me were! de ye.
3 Qencî, kerem, an jî:Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA DUWEMÎN JI KORÎNTIYAN RE

RAYEDARIYA ŞAGIRTIYÊ

*Pêşgotin*

Nûçewan Pawlos, 5-6 sal paşî gera xwe yî pêşîn, carek din serî da herêmên Korîntê û sê meh li wir ma (K.Şa. 20:2,3), dawiyê derbasî Makêdonyayê bû. Tevliheviyên ruhanî yên li Korîntê, dêvla aş bibe, hîn jî zêde bûbû. Berî vêya, Pawlos nameyekî din ji vê Civakê (Dêrê) re nivîsandibû (2:3,4). Tîtûsê nameyê bir, êş û keserên ku Korîntiyan dikişînin, têgîhand Pawlos (2:13; 7:5-7). Li ser vêya Pawlos, bi peyxama Xwedê vê nameyê ji wan re şand (7:5-16).
Vê nameya ku salekî paşî nameya yekemîn (di sala 56'an, an jî 57'an de) hatiye nivîsandin, hêsên Nûçevanê Xwedê eşkere dike. Mîna nameya din li vir jî qala vejîna miriyan dike (5:1-10), sedema xelat dayinê (Birrên 8 û 9). Bi vî awayî Pawlos, Civaka li Korîntê ye, bona alîkariyê ji xizanên Orşelîmê re bikin, dilawêr dike (8:4,19,20; 9:1,12,13).
Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:
1. Ceribandinên Nûçevan Pawlos 1:1-2:17
2. Xizmeta Nûçevan Pawlos, ya tê ceribandin 3:1-7:16)
3. Xelatên Ruhanî 8:1-9:5
4. Rayedariya Şagirtiyê 10:1-13:14

*Destpêk û silav*

1 Pawlosê ku bi viyana[1] Xwedê
ve şagirtê Mesîh Îsa û birayê
Tîmotêyos, ji hemû pîrozên li her
aliyê Ahayayê ne û Dêra Xwedê[2],
ya li Korîntêye re: 2 Bila ji Bavê
me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh
ve kerem û dilxweşî ji we re be!

*Xwedayê ku bingeha xemrevîniyê ye*

2.Kor 4,8-18; 2.Tîm 2,8-12; Fîl 1,27-30

3 Bila ji Xwedayê ku binge-
ha her tewr xemrevîniyê ye, ji
Bavê bi dilovanî, ji Xwedê û
Bavê Xudanê me Îsa Mesîh re
pesnahî be! 4 Bona bi xemrevî-
niya ku me ji wî ve stendiye em

---

[1] Daxwaz, îrade.

[2] Civaka Xwedê.

kesên di her tewr tengasiyê de ne
xemrevîniyê bikin, me di hemû
tengasiyê me de xewrevîn dike.
5 Ji ber ku em çawa keserên
Mesîh bi pirranî dikişînin, bi
navgîniya Mesîh xemrevîniya
me jî ûsa zêde dibe. 6 Lê belê
ger em tengasiyê dikişînin, ev
bona xemrevînî û xelasiya we ye
û ger em bêne xemrevînîkirin, ev
bona kiryarê xemrevîna we ya di
baldirêjiya eynî keserên ku em
dikişînin de ye. 7 Hêviya me yî
bona we nalerize[1]; ji ber em di-
zanin ku: Mîna hûn dibin şirîkên
keserên me, hûn ê şirîkê xemre-
vînên me jî bin.
8 Ji ber ku ya birano, em naxwazin
hûn ji tengasiyên ku me li Asyayê
kişandine, bêhay bin; em di binê
barekî ku zêdeyî quweta hilgirtina
me de bûn; heta ku, hêviya me yî
jiyanê jî nema bû; 9 lê belê, banga
mirina me jixwe di me de bû; da
ku, em ne bi xwe, lê bi Xwedanê
ku miriyan divejîne hêvî bikin;
10 wî me ji mirinekî ewqas me-
zin xelas kir û dê hîn jî xelas bike.
11 Û hûn jî, bi duayên xwe ji me
re bi alîkarî kirinê ve, dê dîsa di
derheqê xelaskirinê de hêviya me
ji wî hebe; da ku, bona keremiya
ku bi dua gellekan ji me re hatiye
peyda kirin, dê ji devê gellekan ji
ber me, şikirî bête kirin.

### *Parastina Pawlos*

1.Sel 2,3-12; 1.Kor 4,18-21; 16,5-7

12 Ji ber ku pesin dayîna me ev e,
yanê, li dinê û bi zêdeyî li dijî we
pîrozî û safîbûna Xwedê, ne bi
zanyariya cismanî, lê belê şahdeyiya
ûcdanê me ye ku em bi xêra Xwedê
di tevgerê de ne. 13 Ji ber ku xeynî
tiştên ku hûn dixwînin, an jî nas
dikin, em tiştekî din nanivîsînin; lê
belê mîna ku we me heta derecekê
fêhm kirine, 14 ez hêvîdar im ku
hûn me bi tûmî nas bikin; ûsa ku,
di roja Xudanê me Îsa de mîna ku
pesnahiya me hûn in, em jî bibin
pesnahiya we.
15 Û bi vê ewlebûnê, bona ku hûn
bigihêjin nîmeta duwemîn ez di nêta
ku, pêşiyê werim cem we û ji we
derbasî Makêdonyayê bibim û dîsa
ji Makêdonyayê bêm cem we 16 û
ji aliyê we ve bi Cihûstanê ve bême
şandin de bûm. 17 Niha dema min
vêya nêt kir, gelo min sivikî kir? An
jî bona ku bi min re belê belê û na
na bibe, gelo tiştên ku nêt lê anîme,
li gor bedenê nêt kirim?
18 Lê belê Xwedê ewledar e ku,
gotina ku me têgihandiye we, erê
û na nîne! 19 Ji ber ku di nav we
de Lawê Xwedê Îsa Mesîh ê ku bi
navgîniya me, bi navgîniya min û
Sîlvanos û Tîmotêyos ve hatiye
waz kirin, nebû erê û na; lê belê
di wî de erê bû[2]. 20 Ji ber ku çi-

1 An jî: Pêdandî, sabît.

2 Di wî de erê heye, an jî: Di wî de erê çê bû.

qas wadên Xwedê hebe, erêyên
wan di wî de ne; ji ber vê yekê,
bi navgîniya me bona bilindahi-
ya Xwedê, Amîn jî bi navgîniya
wî ye! 21 Û yê ku me bi we re
di Mesîh de zeximandiye û yê ku
me mesh kiriye Xwedê ye. 22 Û
wî me mor kir û bona ewledariyê
Ruh da dilên me.
23 Lê belê ez Xwedê bo canê xwe
şahde digirim ku, sedema dîsa
nehatina minî Korîntê parastina
we bû. 24 Em naxwazin ku bibin
serwerê baweriya we; lê belê em
alîkarên kêfxweşiya we ne; ji ber
ku hûn di baweriyê de pêdandî di-
sekinin.

2 Lê belê min biryar da ku ez ê
dîsa bi keser neyêm cem we.
2 Ji ber ku ger ez we bikesirî-
nim, xeynî hûn ên ku min wan
kesirandiye, dê kî bimîne ku min
kêfxweş bike? 3 Û min vêya eynî
ûsa nivîsand ku dema ez bêm, yên
ku min kêfxweş bikin, bila min
nekesirînin; ji bo kêfxweşiya min,
kêfxweşiya we hemûyan e, bawe-
riya min bi we hemûyan re heye.
4 Ji ber, ne bona ku hûn bikesi-
rin, lê bona ku hûn hezkirina minî
mezin ji bo we heye bizanibin, bi
tengasiyek mezin û di nava êşa dil
de, bi gellek hêstirên çavan ji we
re nivîsandim.

*Bexşandina kesekî bisûc*

2.Kor 7,5-16; Lûq 17,3

5 Lê belê ger kesekî keserê dabe,
ne ji min re, lê – ji bo ku ez fîşal
nekim –, heta dereceyekê keserê
da we hemûyan. 6 Ji yekî ûsa re,
ev cezaya ku ji aliyê pirraniyê ve
ye, bes e; 7 bona ku bi kesera zêde
nekeve, divê hûn wî efû bikin û
xemrevîniyê ji wî re bikin. 8 Ji
ber vê yekê ez rica dikim ku hûn
hezkirina xwe ji wî re nû bikin. 9
Ji ber ku, bi gotina, hela ka hûn
di her rewşê de îtaetkar in, ez bi
eyarê we bizanibim, nivîsandim.
10 Lê belê hûn ji kê re tiştekî
bibexşînin, ez ê jî; ji ber ku ger min
tiştekî bexşandibe, min wê jî bona
we, di hafa[1] Mesîh de bexşand; 11
da ku, em ji aliyê Îblîs ve neyên
mexdûr kirin; ji ber ku em ji dek
û dolavên wî ne bêhay in.

*Şandiyên Peymana Nû*

Rom 15,16-19; 1.Kor 1,17-24; 2.Kor 4,1-7

12 Û dema ez ji bona Mizgîniya
Mesîh hatim Troasê û di Xudan
de deriyek ji min re vebûbû, 13 ji
ber ku min birayê xwe Tîtûs ne-
dît, di ruhê min de aramiya min
tunebû; lê belê min xatir ji wan
xwest û çûm Makêdonyayê.
14 Lê belê, bila ji Xwedayê ku me
her tim di koma serkeftina Mesîh
de dide meşandinê û bêhna nas ki-
rina xwe yî di her derê de bi navgî-
niya me belav dike re şikirî bibe!

---

[1] Hizûr.

15 Ji ber ku em di yên xelas dibin
de û di yên helaq dibin de, bona
Xwedê bêhna Mesîh ya xweşik in;
16 bona vana bêhna mirinê ya ku
dibe mirinê ne û bona wana bêhna
jiyanê ya ku dibe jînê ne. Û ma kî
pisporê kareki ûsa ye[1]? 17 Ji ber
ku em ne mîna gellekên ku gotina
Xwedê xera dikin in, lê belê em ji
paqijiyê û ji Xwedê ve, di hizûra
Xwedê de, di Mesîh de dibêjin.

3 Qey dîsa me dest bi salixda-
na[2] xwe kir? Ya na qey hewca
me mîna hinekan ji we re, an jî
nameyên salixdana ji we heye?
2 Nameya di dilê me de hatiye
nivîsandin û ji aliyê hemû mi-
rovan ve tê zanîn û tê xwendin
hûn in. 3 Eşkere ye ku, hûn ji
aliyê me, wekî ku nameya Mesîh
bin, ya ku ne bi hibrê, lê belê bi
Ruhê Xwedayê ku zindî ye, ne li
ser lewhên kevir, li ser lewhên
dilên ji goşt in; hatine nivîsîn[3].
4 Û bi navgîniya Mesîh, ewle-
dariyek me yî ûsa ji Xwedê re
heye; 5 bona ku em tiştekî bi
serkeftina xwe bihesibînin, em
bi xwe ne pispor[4] in; lê belê pis-
poriya me ji Xwedê ye. 6 Û wî
me ne ji zagonê, ji tîpê, lê belê ji
xizmetkarbûna peymanekî[5] nû ya
xwe spartiye Ruh ve pispor danî;
ji ber ku tîp dikuje, lê belê Ruh
dijîne.

*Bilindahiya Peymana Nû*

Yû 1,17; Gal 3,8-29;
Îbr 7,18-28; 8,6-13; 12,18-29

7 Lê belê ger xizmeta mirinê, ya
ku bi tîpan li keviran hatiye ko-
landin di nava bilindahiyê de hati-
be; ûsa ku, lawê Îsraêl ji berya bi-
riqandina wî yî bi demî nikarîbûn
li wecê Mûsa binêriyan; 8 bilin-
dahiya xizmeta ku bona Ruh tê
kirin, dê çawa hîn jî ne biryar be?
9 Ji ber ku ger bilindahiya xizme-
ta mehkûmiyetê hebe, dê bilin-
dahiya xizmeta ku pakbûnê pêk
tîne hîn jî zêde be. 10 Ji ber, yê ku
hatiye bilind kirin, di derheqê wê
de, ji ber sedema mezintiya hîn jî
seretetir nehat bilind kirin. 11 Ji
ber ku ger yê derbas dibe bi bilin-
dahiyê ve hatibe, dê çiqas zêde yê
ku abadîn dimîne, di nava bilin-
dahiyê de bimîne[6]!
12 Niha bona ku em xwediyê
hêviyek ûsa ne, em bi cesaretek
mezin diaxifin 13 û em ne mîna
Mûsayê bona ku lawên Îsraêlê
dawiya yê derbasbûyî nebînin,
berûkê[7] da ser wecê xwe ne. 14
Lê belê hişê wan kor bû; ji ber ku

1 An jî: Û ma kî besî van tiştan e?
2 An jî: Amojgarî, tewsiye.
3 Hatine amade kirin.
4 An jî: Bes, ehîl.
5 Ehdek.
6 An jî: Bilindahiya yê ku baqî dimîne hîn jî zêde mezintir e.
7 Serûk.

di Mesîh de betalbûna wê, ji wan re nehat kişf kirin û bi vî awayî eynî berûk, di xwendina Peymana kevin de heta roja îro dimîne. 15 Çi heye ku heta îro, dema Mûsa tê xwendin, berûkek dilê wan dixumîne. 16 Lê belê çi demê vegere Xudan, dê ew berûk bê rakirin. 17 Û Xudan Ruh e û Ruhê Xudan li ku be, azadî li wir e. 18 Lê belê em gişt, bilindahiya XUDAN bi rûyekî bêpêçek, wekî ku di mirêkê de be dîtinê ve ji bilindahiyan heta bilindahiyan de di eynî sûretê de têne guhertin; ev jî ji aliyê Xudanê ku Ruh ve ye.

*Em dilawêriya xwe winda nakin*

1.Sel 2,1-6; 2.Kor 2,14-17

4 Ji bo vê yekê, li gor ku em gîhaştine dilovaniyê, gava ku ev xizmeta me hebe, em dilawêriya[1] xwe winda nakin[2]; 2 lê belê me, bi fenekiyê ve ne meşandinê, kelama Xwedê neşewşandinê, lê bi derketina rasteqîniyê xwe di hizûra Xwedê de ji ûcdanê her mirovî re bi pend[3] dayînê ve tiştên veşartî yên şermezariyê red kirin. 3 Û ger Mizgîniya me pêçayî jî be, bona kesên helaq dibin pêçayî ye; 4 bona ku ronahiya Mizgîniya bilindahiya Mesîhê xuyaniya Xwedê ye, têdighîne bi ser bêbaweriyan ve nehêlê, îlahê vê demê hişê wan kor kiriye. 5 Ji ber ku em ne xwe; lê belê em Mesîh Îsa bi Xudanî û xwe jî di oxra Îsa de wekî xulamên we bin, waz dikin. 6 Ji ber Xwedanê ku gotiye: Dê di tariyê de ronahî bibiriqe[4], bona ku ronahiya bilindahiya zanyariya Xwedê, ya di wecê Îsa Mesîh de dibiriqe bide me, di dilên me de biriqî.

*Xezîna ku di feraxên axînî de ye*

2.Kor 6,3-10; 1,5-11; 2.Tîm 2,8-11

7 Lê belê em di nava feraxên axînî[5] de xwediyê vê xezînê ne, da ku, bila herî meziniya hêzê ne ji me be, lê bila aidî Xwedê be. 8 Me ji her alî ve xistine tengasiyê, lê belê em nehatine eciqandin; em şaş bûne, lê belê ne bêçare ne; 9 em tên fetilandin, lê belê em ne hatine ber dan; em bi erdê ve têk çûne, lê belê helaq nebûne; 10 bona ku jiyana Îsa, di bedena me de xuya bibe, em mirina Îsa her tim di bedena xwe de dikişînin. 11 Ji ber ku, bona jiyana Îsa di bedena me yî bi mirinî de xuya bibe, em, yên ku dijîn, di oxra Îsa de her tim radestî mirinê dibin[6]. 12 Ûsa ku di me de mirin, lê belê di we de jî jiyan çalak dibe.

---

1 Metirsî, cesaret.
2 Nabetilin.
3 Amojgarî, an jî: Tewsiye.
4 (1.Mûsa 1:3)
5 Qafqiloz, gadoş, şikelik, qabên ji axê, an jî: Feraxên erdinî.
6 ...her tim didin destê mirinê.

13 Lê belê çawa ku li gor: Bawerî
anîm û bo wê gotim[1], hatiye ni-
vîsandin; bi xwedîbûna eynî ruhê
baweriyê em jî bawer dikin û bi
vê sedemê em jî diaxifin; 14 ji ber
em dizanin yê ku Îsa ji mirinê ve
vejandiye, dê me jî bi Îsa ve bivejî-
ne û bi we re derxîne hizûra xwe.

*Di jiyana derbasî de çavên me li jiyana bêdawîn dinêrin*

Rom 8,17-18; 1.Pêt 1,6-9; Rom 8,23-25; Fîl 1,23; Îbr 12,28-29; K.Şa 24,15-16

15 Ji ber ku ev hemû bona we ye;
da ku, kerem bi navgîniya gel-
lekan zêde bibe, bila bona bilin-
dahiya Xwedê şikirî zêde bibe.
16 Ji ber vê yekê em cesareta xwe
winda nakin; lê belê her çiqas he-
bûna me yî derve xera dibe jî, he-
bûna me yî hundirîn roj bi roj nû
dibe. 17 Ji ber ku tengasiya me yî
demî û sivik ji me re bilindahiyek
di giraniyê de bi tu tiştî nayê pîvan-
din mezin û bê dawî bi dest dixe;
18 em ne li tiştên xuya dibe, lê belê
li tiştên ku xuya nabe, dinêrin; ji
ber ku yên xuya dibin, demî ne, lê
belê yên xuya nabin, abadîn in.

5 Ji ber em dizanin ku: Ger mala
me yî kona dinyewî xera bibe,
li ezman ji Xwedê ve xaniyek me,
xaniyek me yî bi desta ve nehatiye
çêkirin û abadîn e, heye. 2 Ji ber
ku em niha bi bêriya li xwe kirina
xaniyê xwe yî ezmanî ve bi rastî jî
di vê de axînê dikişînin; 3 qet nebe
ger li xwe kiribin, em ê tazî neyên
dîtin. 4 Ji ber ku em, yên di vê konê
de ne, wekî di binê bar de bin, axînê
dikişînin; ji ber ku ne ji xwe kirinê[2],
lê tenê li xwe kirinê dixwazin; da
ku, yê bi mirinî be, bila ji aliyê
jiyanê ve bête daqurtandin. 5 Yê
ku me bona vê armancê amade
kiriye û yê bona ewledariyê Ruh
daye me Xwedê ye.
6 Ji ber vê yekê her tim cesareta
me heye û em dizanin ku: Heta em
di vê bedenê de bijîn, li dûrî Xu-
dan in. 7 Ji ber ku em bi spartina
baweriyê ve dijîn û ne bi xuya ki-
rinê. 8 Û ez, em ewle ne, dibêjim
û hîn jî zêde li dûrî bedenê û li
cem Xudan bûnê dixwazin. 9 Bo
vê yekê, dixwaze di bedenê de bi-
jîn, dixwaze li dûrî bedenê bin jî,
xwestina me xoşnûd kirina wî ye.
10 Ji ber ku divê em hemû li ber
kursiya darazkirinê, ya Mesîh ve
xuya bibin; da ku, her kes, divê
qenc an jî xerab, li gor tiştên ku
kirine, di bedenê de tiştên ku ha-
tine kirin bigirin.

*Wezîfa lihevanînê*

Yû 3,16-18; 1.Tîm 2,3-7; Rom 5,1-11

11 Niha, em bi zanîna tirsa Xu-
dan ve mirovan qanih dikin; lê

1 Zebûr 116:10

2 Tazî bûn, tazî kirin.

belê em ji Xwedê re hatin eşkere
kirin û ez hêvîdar im ku em ji
ûcdanê we re jî hatibin eşkere
kirin[1]. 12 Ji ber ku em xwe dîsa
ji we re salix nadin; lê belê em
fersenda bona me pesnahî dayînê
didin we; da ku, bersivek we yî
ji yên pesnê xwe ne bi dil, bi
xuyayiya derve didin hebe. 13 Ji
ber ku ger em ne di xwe de bin,
ev bona Xwedê ye; ger hişê me li
serê me be, ev bona we ye. 14 Ji
ber ku hezkirina Mesîh zorê dide
me û daraziya me ew e ku: Kesek
di oxra her kesî de mir; ger wusa
be, hemû mirin 15 û ew di oxra
her kesî de mir; da ku, yên di-
jîn bila êdî ne bona xwe, lê belê
bona yê ku di oxra wan de miriye
û vejiyaye bijîn.
16 Bi vî awayî, em êdî kesekî li
gor bedenê nas nakin û ger me
Mesîh li gor bedenê nas kiribin jî,
êdî niha ûsa nas nakin. 17 Ûsa ku:
Ger kesek di Mesîh de be, afirek[2]
nû ye; tiştên kevn derbas bûne, a
vay, her tişt nû bûye. 18 Lê belê
her tişt ji Xwedê ye, wî, bi nav-
gîniya Mesîh me bi xwe re li hev
anî û xizmeta li hev anînê da me;
19 yanê, bi xwe dinê pevra li hev
anînê, bi sûcên wan li ser wan ve
nehesibandinê û bi radestî me ki-
rina kelama li hev anînê, Xwedê
di Mesîh de bû. 20 Niha, mîna
ku Xwedê wekî ku bi navgîniya
me rica dike, em di oxra Mesîh
de şandîtiyê dikin û bi gotina,
bi Xwedê re li hev werin, em di
oxra Mesîh de lava dikin! 21 Yê
ku bi gunehê nizane bona me kir
guneh, da ku, em di wî de bibin
rastiya Xwedê[3].

*Xizmeta Şagirtan giran e, lê belê birewnaq e*

1.Sel 2,1-13; 2.Tîm 3,10-11; 2.Kor 11,23-30; K.Şa 20,18-35

6 Û em jî, yên bi wî re dixebitin,
bona ku hûn kerema Xwedê bi
valahiyê qebûl nekin, ji we re rica
dikin. 2 Ji ber ku dibêje:
Di dema munasîb de min te bihîst
û di roja xelasiyê de alîkariyê bi
te re kirim[4].
Dema munasîb a vay, niha ye;
roja xelasiyê a vay, niha ye!
3 Em di tu tiştî de tilpekiyê nadin
tu kesî, da ku, bila xizmeta me
neyê şermezar kirin; 4 lê belê em
bi xizmetkarê Xwedê bûna xwe,
di gellek sebrî de, di tengasiyan
de, di astengiyan de, di hewce-
dariyan de, 5 di lêxistinan de, di
girtîgehan de, di tevliheviyan de,
di kedan de, di bêxewiyan de, di
rojiyan de, 6 di paqijiyê de, di
zanînê de, di berxwedanê de, di

1 Em çi ne, Xwedê dizane. Lê ez hêvîdar im ku hûn jî çibûne me di ûcdanê xwe de dizanin.
2 Mexlûqek.
3 Dadmendiya, an jî: Pakbûna Xwedê.
4 Îşaya 49:8

qenciyê de, di Ruhê Pîroz de, di
hezkirina bêdurûtî de, 7 di go-
tina rastiyê de, di qudreta Xwedê
de, li rast û çepê bi çekên rastiyê
ve, 8 bi bilindahî û heqaretê ve,
bi namdariya xerab û namdariya
qenc ve, mîna xapînokan, lê belê
wekî rastan; 9 mîna nenasan, lê
belê wekî kesên qenc tên zanîn;
mîna yên dimirin, lê belê a vay,
em dijîn; mîna kesên têne perwer-
de kirin, lê belê wekî yên nehatine
kuştin; 10 mîna bi keseran, lê belê
her tim wekî kesên kêfxweş di-
bin; mîna xizanan in, lê belê wekî
gellekan dewlemend dikin; mîna
kesên ku qet tiştekî wan tune ne,
lê belê wekî bi xwedîbûna her
tiştî, em di her tiştî de penda xwe
didin.

11 Ya Korîntiyan, devê me ji we
re vebûye, dilê me fireh bûye!
12 Hûn di me de teng nebûne,
lê belê hûn di dilê xwe de teng
bûne! 13 Bona ku hûn jî bersiva
mîna vêya bidin me – mîna ez ji
zarokên xwe re bibêjim, dibêjim
– hûn jî fireh bibin!

*Em Perestgeha Xwedê ne*

1.Kor 10,14-22; Ef 5,5-11; Pey 18,4;
1.Pêt 2,9-12; Îşa 52,11

14 Bi bêbaweriyan re nekevin
bin nîrekî nerewa[1]! Ji ber ku çi
şirîkantiya rastî û fesadiyê dibe?
An jî çi hevrebûna ronahî û tari-
yê dibe? 15 Û dê di nava Mesîh
û Belîal[2] de çi tifaq dibe? An jî
çi pardariya yê bawerkiriye ji
kesê bêbawerî re dibe? 16 Û çi
hemfikir bûn di nava perestgeha
Xwedê û pûtan de dibe? Ji ber ku
em perestgeha Xwedayê zindî ne;
ji ber ku Xwedê gotiye: Ez ê di
nav wan de rûnim û di nav wan
de bimeşim û ez ê bibim Xwe-
dayê wan û ew ê bibin gelê min[3].
17 Bo vê yekê Xudan dibêje: Ji
nava wan[4] derkevin û cûda bibin
û dest bi yê mindar nedin! Û ez ê
we qebûl bikim[5]. 18 Xudanê hêza
wî besî her tiştî ye dibêje: Ez ê ji
we re bibim Bavo û hûn ji min re
dê bibin lawan û keçan[6].

7 Niha, ya xoşewîstno, li gor
em xwediyê van wadna ne,
em xwe ji her tiştê ku beden û
ruh biqirêj dike safî bikin; di tirsa
Xwedê de bijîn û di pîroziyê de
birewnaq bin!

*Kêfxweşiya Pawlos*

1.Sel 3,5-9

2 Di dilên xwe de cîh bidin me:
Me neheqiyê ji tu kesî re nekir,
kesî ji rê dernexist, keda kesekî
nexwarin. 3 Ez vana, bona daraz

---

1 Bêsemt, bêrê, an jî: Biyanî.
2 Îblîs.
3 (2.Mûsa 29:45; 3.Mûsa 26:12)
4 Bêbaweriyan.
5 Îşaya 52:11
6 Hoşeya 1:10

kirina we nabêjim; ji ber ku min
berê got, em ê bi we re bimirin jî û
bijîn jî, hûn di dilê me de ne. 4 Ez
pirr bi we ewle dibim, bi we re pirr
pesnvedana xwe didim; bi xemre-
vîniyê ve tijî me; di nava hemû
tengasiyên me de bi kêfxweşiyê
ve zehf xuroş im.
5 Ji ber ku dema em hatin Makê-
donyayê jî, qet rehetiya bedena
me tunebû; lê belê me ji her alî
ve tengasiyê dikişand; ji derve
şeran, di hundir de tirsan hebû.
6 Lê belê Xwedayê ku xemrevî-
niyê bi kesên kêm ve dike, bi ha-
tina Tîtûs ve û tenê ne bi hatina
wî ve, lê belê di derheqê min de
bêrîkirina we, xem û xîreta we
têgîhand min, 7 bi xemrevîniya
ku ji we ve xemrevîn bûye, xem-
revîniyê li me kir; bi vî awayî, ez
hîn jî kêfxweş bûm. 8 Ji ber ku
ger bi nameya xwe we êşandibim
jî, ez ne poşman im; ji ber ku ger
ez poşman bibim jî, bi demek
kurt bûna wê pev re ez dibînim
ku ew name êşê dide we; 9 niha
ez kêfxweş im, ne bi xemgîniya
we, lê belê ji ber ku hûn bona
tobê xemgîn bûne ez kêfxweş im;
ji ber ku hûn li gor Xwedê xem-
gîn bûn; da ku, hûn di tu tiştî de
ji me ziyanê[1] nebînin. 10 Ji ber,
kesera ku li gor Xwedê ye, bona
xelasiyê toba bêpoşmanî peyda
dike; lê belê kesera dinê mirinê
peyda dike. 11 Ji ber ku a vay, ev
tiştê wekhev, yanê, li gor Xwedê
keser kişandina we, di we de çi
xîret û hîn jî çi borîn xwestin, çi
sûh ketin, çi tirs, çi bêrî kirin, çi
piştgirtin, çi tol hildan pêk ani!
Di vî tiştî de we pak bûna xwe ji
her alî ve nîşan dan. 12 Ger min
ji we re nivîsandibe jî, ne bona
kesên neheqiyê dikin, ne jî bona
yê neheqiyê dibînin; lê belê bona
xîreta me yî di derheqê we de ye,
di hizûra Xwedê de ji bona qenci-
ya we xuya bibe[2].
13 Ji bo vê yekê li me xemrevîn-
kirî hate kirin û li ser kêfxweşiya
Tîtûs, em di xemrevîniya xwe de
hîn jî kêfxweş bûn; ji ber ku ruhê
wî ji aliyê we hemûyan ve arami-
yê dît. 14 Ji ber ku ger ji wî re,
di derheqê we de bi tiştekî pesnê
xwe dabim jî, ez şermezar nebûm;
lê belê mîna ku me her tiştî bi ras-
teqînî ji we re gotibûn, pesnve-
dana me yî li ber Titûs jî ûsa rast
derket. 15 Û her ku îtaet kirina we
hemûyan, çawa bi tirs û lerizan-
dinê ve qebûlkirina we yî xwe di
bîr de tîne, hezkirina wî yî ji we re
hîn jî zêde dibe. 16 Ji bo ku di her
tiştî de, di derheqê we de ewlebû-
na min heye, ez kêfxweş dibim.

---

[1] Zerarê, xesarê.

[2] An jî: Lê belê bona xîreta me yî di derheqê we de ye li cem Xwedê, ji we re bête eşkere kirin.

*Wekoka comerdiyê*

K.Şa 11,27-29; 2.Kor 9; Rom 15,25-27

8 Niha, ya birano, em keremi-
ya Xwedê ya ji Dêrên Makê-
donyayê re hatiye dayîn ji we re
digihînin ku; 2 di navbera ceri-
bandina mezin ya tengasiyê de,
tevî xizaniya wanî kûr ji serreçûna
wanî kêfxweşiyê, di dewlemendi-
ya wanî comerdiyê de ji ser re çû.
3 Ji ber, bona beşdariya xizmeta ji
pîrozan re û bona xêra wî, bi gellek
hewîniyê û ji me bi rica kirinê, li
gor qudretên xwe, 4 ez şahdeyiyê
dikim ku, di ser qudretên xwe de jî
bi xwestekên xwe dan. 5 Û ji hêvî
kirina me zêdetir, xwe pêşiyê dan
Xudan û pişt re bi xwestina Xwe-
dê dan me. 6 Bo vê sedemê, bona
ku ev karê di nava we de ji berê ve
dest pê kiriye biqedîne, me Tîtûs
teşwîq kirin. 7 Lê belê di baweri-
yê de, di gotinê de, di zanînê de û
di xîreta her tewrî de, di hezkiri-
na we yî ji me re de, mîna ku hûn
di her tiştî de sereta ne, bi sereta
bûna wî karê bi xêr jî binihêrin!
8 Vêya mîna emrekî nabêjim, lê
belê dixwazim ku hezkirina we yî
ji dilî, bi xîreta yê din re bidim ber
hev[1] û biceribînim. 9 Ji ber ku hûn
kerema Xudanê me Îsa Mesîh di-
zanin; bona ku bi xizaniya wî hûn
dewlemend bibin, dewlemend bû
jî, bona we xwe xizan kir.
10 Û di vêya de raya xwe didim; ji
ber ku ev ji we re bi fêde ye; hûn
ku, ji sala çûyînê ve tenê ne di ki-
rinê de, lê belê di xwestinê de jî yê
berê dest pê dikir bûn. 11 Niha jî
vî karî biqedînin; ûsa ku, mîna hûn
bi daxwazîkirina vêya bi xwestek
in, bi vî awayî bila li gor malê we
qedandin jî bibe. 12 Ji ber ku ger
xwestek hebe, ne li gor tiştên ku di
destê yekî de nîne, mîna ku li gor
tiştên di destê wî de ye, alîkirina
wî li cîh e. 13 Ji ber, ne bona ku
ji kesên din re rehetî, ji we re bibe
tengasî; lê belê ji ber wekheviyê:
14 Bona ku bila zêdeyiya wan ji bo
kêmasiya we be, di dema niha de
zêdeyiya we ji bo kêmasiya wan e;
15 da ku, mîna hatiye nivîsandin:
Ji yê pirr berhev kir re zêde nebû
û ji yê hindik berhev kir re kêm
nebû[2], bila wekhevî bibe.

*Şandina Tîtûs û birayên din*

1.Kor 16,1-4; 2.Kor 9,1-5

16 Lê belê bila şikirî ji Xwedayê
ku, bona we eynî xîretê daye
dilê Tîtûs, re be! 17 Ji ber ku wî
teşwîqa me qebûl kir, lê belê ew
hîn jî bi xîretê, bi xwestina xwe tê
cem we. 18 Tevî wî, em birayekî ji
bezana wî ya belav kirina Mizgî-
niyê di nava hemû Dêran de pesnê
wî tête dayîn dişînin. 19 Û ne tenê
ev, lê belê bona bilindahiya Xudan

1 Miqayese bikim.

2 (2.Mûsa 16:18)

û bona xwestina me xuya bikin,
di xizmeta me yî vê xêrê de, bona
bibe rêhevalê me ew ji aliyê Dêran
ve jî hate bijartin; 20 di vê xizmeta
xwe yî bexşandina mezin de, bona
ku em nebin armancê rexneyên
tu kesî em pûte didinê[1]; 21 ji ber
em bala xwe didin ku tenê ne di
hizûra Xudan de, di hizûra miro-
van de jî em ya rast çêkin. 22 Me
birayê xwe yî pirr caran û di gellek
rewşî de bi xîret dîtine, lê belê yê
niha ewledariya di derheqê we de
dibihîze pirr zêde bi xîret bûye, bi
yên din ve ji we re şandin. 23 Dema
em bên Tîtûs, ew pardar û ji bona
we kedkarê min e; lê birayên me jî
şagirtên Dêran, pesnahiyên Mesîh
in. 24 Niha nîşana hezkirina xwe û
pesnahiya me yî di derheqê we de,
li ber Dêran nîşanî wan bidin!

*Alîkariya ji bawerkirên xizan re*

9 Ji ber ku hewce nake ez di
derheqê xizmeta ji bo pîrozan
re ye de, ji we re binivîsînim; 2 ji
ber ez dizanim ku hûn bona alîka-
riyê amade ne; ez bi gotina hûn,
yên li Ahayayê, ji sala çûnê ve
amade ne, li berya Makêdoniyan
pesnê we didim û xîreta we, gelle-
kan derbasî tevgerê kir. 3 Lê belê
bona pesin dayîna me ya di der-
heqê we de di vê babetê de vala
nemîne û mîna ku min gotiye hûn
amade bûbin, min birayan şand;
4 da ku, gava Makêdonî bi min
re bêne û we amadekirî nebînin,
em – bona ku em nebêjin; hûn
– di vê ewlekirinê de bi avayekî
şermezar nebin. 5 Bo vê sedemê
bila ji berê ve bên cem we û xe-
latên ku dana wan we bi comerdî
wad kirin amade bikin, min rica
kirina ji birayan li cîh dît; da ku,
bila xelata we ne wekoka timati-
yê, bila bi wekoka comerdiyê ve
amade bibe.

*Xwedê ji kesên comerd hez dike*

M.Sil 19,17; Îbr 13,16; Fîl 4,15-19;
1.Yû 3,16-18

6 Lê belê vêya ji bîr mekin ku: Yê
kêm biçînin, dê kêm jî dirûnin û
yê zêde biçînin, dê zêde jî dirûnin.
7 Ne mîna bi nexwestinê an jî bo
zordanê, bila her kes li gor ku di
dilê xwe de nêt kiriye bide; ji ber
ku Xwedê ji yê bi kêfxweşiyê
dide hez dike! 8 Û hûn, bona di
her tiştî de, di her demî de, ji bona
her karê qenc, bi zêdeyî bibin
xwediyê her tiştî, Xwedê qasî her
nîmetî bona we zêde bike bihêz e;
9 herweha hatiye nivîsandin:
Wî belav kir, da xizanan; rastiya
wî heta bêdawiyê disekine[2].
10 Û yê ku ji cotkar re tov û bona
xwarinê nan peyda dike, dê çin-
andina we peyda û zêde bike û

[1] Dîqet dikin.

[2] Zebûr 112:9

dê dexlê rastiya we zêde bike;
11 bona ku hûn ji her alî ve co-
merd bibin, hûn ji her alî ve tên
dewlemend kirin; bi navgîniya
me dibe sedema şikirya Xwedê.
12 Ji ber ku ev xizmeta ku hûn
dikin tenê bi qedandina kêmasiya
pîrozan namîne, lê di eynî demê
de bi şikirya gellekan ya ji Xwe-
dê re jî dewlemend dibe; 13 ew bi
ceribandina vê xizmetê bi sedema
îtaet kirina mukuriya we yî Miz-
gîniya Mesîh û ji ber destfirehiya
xizmeta ji wan re û ji hemûyan re,
Xwedê bilind dikin; 14 bona ke-
rema sertaybetî ku Xwedê ji we re
bexşandiye, bona we dua dikin û
bêriya we dikin. 15 Bila bona di-
yariya wî ya ku bi gotinê ve nayê
vegotin şikirî ji Xwedê re be!

*Parastina Pawlos*

1.Kor 2,1-5; Rom 15,17-19;
2.Kor 13,2,4.10; Gal 1,11-2,21

10 Yê dema di nava we de
bû tirsok, lê belê dema ne
di nava we de be li hemberê we
bê tirs, ez, Pawlos, bi dilnizmî û
nermiya di Mesîh de ji we re rica
dikim 2 û li ber we digerim ku,
dema ez werim cem we, li berya
hin kesên ku me li gor bedenê
dijî dihesibînin, bona cesareta ku
ez xuya bikim bi eynî ewlebûnê
xuyayî we jî bikim, zorê nedin
min. 3 Ji ber ku em di bedenê de
bijîn jî, bi sipartina bedenê ve şer
nakin; 4 ji ber ku çekên şerê me ne
çekên cismanî, lê belê çekên xwe-
diyê hêza Xwedanî ya kelehan
xera dike ne; 5 em ramanan û her
tiştên bilind[1], ên ku li dijî zanîna
Xwedê radibe, xera dikin û her
fikrê ji îtaeta Mesîh re dîl dikin
6 û kengî îtaeta we temam bibe,
em ji bo tolhildana her bêîtaetiyê
amade ne.
7 Li ya li berya çavên xwe ne,
binihêrin. Ger kesek bi aidbûna
xwe yî Mesîh ve ewle be, bila
dîsa vêya jî bifikire ku, ew bi xwe
çawa be, em jî bi vî awayî aidî
Mesîh in. 8 Ji ber ku ez ne bona
têkçûna we, bona pêş ve birina we
bi rayedariya ku Xudan daye me
ve hinek zêde pesnê xwe bidim jî,
ez naşerm im; 9 da ku, ez naxwa-
zim di nameyên xwe de mîna we
bitirsînim xuya bikim. 10 Ji ber ku
dibêjin: Nameyên wî giran û xwurt
in[2], lê belê hebûna bedenê lawaz û
gotina wî hîç e. 11 Bila zilamekî
ûsa vêya bifikire ku, dema em ji
we dûr in, bi navgîniya nameyan,
di kelamê de çawa bin, dema ama-
de bin di kar de jî wusa ne.
12 Ji ber ku em nawêrin ku xwe
bi hinekên ku pendê xwe didin re
yek bigirin, an jî miqayesê bikin!
Lê belê ew bi xwe bi xwe pîvanê

*1* Gotinên vala û bêbinî.

*2* Bihêz in.

û bi xwe bi xwe miqayese kirinê
ve fêhm neker dibin.
13 Lê belê em ne ji tiştên ku ji
pîvana me wêdetir in, lê bi pîvana
ku ji bo heta em bigihêjin we jî, li
gor pîvana hidûdê ku Xwedê mîna
pîvanekê ji me re pîvaye pesnên
xwe didin. 14 Ji ber, mîna ku em
negîhaştibin we, em xwe zêde dirêj
nakin; ji ber ku di Încîla Mesîh de,
em gihaştin heta we jî. 15 Bi pesn-
vedana keda kesên din jî em ji ser
heda xwe ve naçin; lê belê hêviya
me ew e ku, her ku baweriya we
mezin bibe, bi saya we qada me yî
çalakiyê heta ku dikaribe dê fireh
bibe; 16 bi vî awayî, em ê bikaribin
ku Mizgîniyê ji we hîn jî wêdetir
ve waz bikin; ji ber em naxwazin
ku bi karên di qada çalakiyên kesên
din de serfiraz in ve pesnahiyê bi-
din. 17 Lê belê yê ku pesnê xwe
dide, bila bi Xudan ve pesnê xwe
bide[1]! 18 Ji ber ku kesê meqbûl ne
yê xwe salix dide, lê belê kesên ku
Xudan wî salix daye yî.

### *Şagirtên sexte*

Gal 1,6-9; 3,1; 4,9-20; 2.Kor 12,11-15;
Met 7,15-20; Rom 16,17-18

11 Xwezîka hûn di bêaqiliyek
biçûk de ji min re diyax
bikin! Û lê belê hûn ji min re di-
yax dikin. 2 Ji ber ku ez di der-
heqê we de bi xîreta Xwedê ve bi
xîret im; ji ber ku min we, mîna
keçikekî pak ji tenê zilamekî re, ji
Mesîh re, bona ku pêşkêş bikim,
bi dergistî kirin[2]. 3 Lê belê çi heye
ku, mîna mar Hawa bi xapînoki-
ya xwe xapand, ez ditirsim ku ra-
manên we jî ji gorî bûna Mesîh,
yê pak û bidilî, ji rê ve bê derketin.
4 Ji ber ku ger zilamê ku were,
Îsayekî din, yê ku me waz neki-
rine, waz bike, an jî ger xeynî yê
ku we stendiye ruhekî din, an jî
mizgîniyek dinî ya ku we qebûl
nekirine hûn bistînin; hûn qenc
tehemûl dikin. 5 Ji ber ez zen na-
kim ku, di tu tiştî de ji şagirtên herî
sereta re kêmasiya min hebe! 6 Lê
belê ger ez di gotinê de ecemî bim
jî, lê ez di zanînê de ne ecemî me
û me vêya di her rewşî de ji her alî
ve şanî we da.
7 An jî ma qey min bona bilin-
dahiya we bi nizmkirina xwe û
ji we re bi bêberdêl têgihandina
Mizgîniya Xwedê, guneh kir?
8 Bona ku xizmetê ji we re bikim,
bi stendina mişeyê ve Dêrên din
tazî kirim! 9 Û dema di nava we
de bûm, hewca min hebû jî, lê
belê ez li we kesekî nebûm bar[3];
ji ber ku birayên ji Makêdonyayê
ve hatin, kêmasiyên min temam
kirin û di her tiştî de bona li we

---

1 Yêremya 9:24
2 Nîşan kirim, nîşan danîm.
3 Giranî.

nebim bar, îhtimamê damê û ji
niha pêv jî ez ê îhtimamê bidimê.
10 Mîna ku rastiya Mesîh di min
de ye; ez bi biryarî karim bibêjim
ku, tu kesê ji aliyê Ahayayê[1] nika-
re min ji vê pesnvedana dûr bixe.
11 Çima? Ma qey bona ku ez ji
we hez nakim? Xwedê dizane.
12 Lê belê bona fersenda kesên
ku ji bo di tiştên pesnê xwe didin
de fersendê nedim wan, ez ê tiştê
ku dikim jî bikim.
13 Ji ber ku zilamên wusa, şagirtên
sexte, karkerên xapînokî, kesên
xemla şagirtê Mesîh didin xwe
ne. 14 Û ev ne tiştekî ecêb e, ji ber
ku Îblîs bi xwe jî xemla milyaketê
tîrêjê[2] dide xwe. 15 Ger xizmet-
karên wî jî xemla xizmetkarên ras-
tiyê bidine xwe, ev ne tiştekî me-
zin e; dê dawiya wan li gor karên
wan be.

*Ger pesnvedanî ferz be*

1.Kor 15,10; 4,9-13; 2.Kor 6,3-10;
K.Şa 20,18-27; 9,16

16 Ez dîsa dibêjim: Bila tu kes min
bêaqil nehesibîne; lê belê ger hûn
wusa dihesibînin, min mîna kesekî
bêaqil qebûl bikin ku, ez jî hinekî
pesnê xwe bidim! 17 Ez gotinên
xwe ne li gor Xudan, lê mîna ku ez
bêaqil bim, bi ewlebûna vê pesna-
hiyê dibêjim. 18 Madem ku gelle-
kan li gor bedenê pesnê xwe didin,
ez ê jî pesnê xwe bidim. 19 Ji ber
ku hûn baqil in, bi dilxweşî ji bê
aqilan re tehemûl dikin! 20 Ji ber
ku ger kesek we bike dîl, ger kesek
we bixwe, ger kesek we rahêle,
ger kesek ji we re kubrê bike, ger
kesek şîrmaqê li we bixe, hûn ê te-
hemûl bikin. 21 Bi şermezariyê ez
dibêjim ku; wekî em lawaz bûbûn.
Lê belê di babetekî de yekî cesa-
ret kiriye ku pesnvedanê bike – ez
mîna yekî bêaqil diaxifim – ez jî bi
pesnvedanê cesaret dikim. 22 Ma
ew Îbranî ne? Ez jî. Ma Îsraêlî ne?
Ez jî. Ma ji zuriyeta Birahîm in?
Ez jî. 23 Ma xizmetkarên Mesîh
in? Mîna ku min aqilê xwe winda
kiribe diaxifim: Ez hîn zêde! Min
hîn zêde kedê da, hîn zêde ketim
girtîgehê, bêjimar min lêxistinê
xwar, gellek carî rastî mirinê ha-
tim. 24 Ji aliyê Cihûdan ve pênc
carî ji çelî yek kêm kotek xwarim.
25 Sê carî bi ço[3] lêxistinê xwarim,
carekî hatim kevir kirin[4]; sê carî
rastî qeza behrê hatim; şevekê û
rojekê di behra vekirî de derbas
kirim; 26 di rêwîtiyan de pirr ca-
ran; di talûkeyên çeman de, di
talûkeyên rêbiran de, di talûkeyên
hemnîjadên xwe de, di talûkeyên
netewan de, di talûkeyên bajêr de,
di talûkeyên çolê de, di talûkeyên

1 Bajarê Ahayayê.
2 Ronahiyê.
3 Bi şiva darê.
4 Recimandin.

behrê de, di talûkeyên nav birayên
sexte de; 27 di kedê û zehmetê de,
gellek caran di bê xewiyê de, di
birçîbûn û tîbûnê de, gellek caran
di rojiyan de, di sermayê de û di
tazîbûnê de mam. 28 Xeynî tiştên
ji derve ne, ya ku her roj min die-
ciqîne, xema ji bo hemû Dêran[1] e.
29 Dê kî bêhêz bibe û ez ê bêhêz
nebim? Dê kî bixînin gunehan û ez
ê neşewitim?
30 Ger pesin dayîn ferz be, ez ê
bi tiştên aidî bêhêzbûna xwe ve
pesnê xwe bidim. 31 Bav û Xwe-
dayê Xudan Îsayê ku abadîn pîroz
e dizane ku, ez derew nabêjim.
32 Li Şamê, waliyê Qiral Arêtas,
bona min bigire, bajarê Şamiyan
girtibû bin parastinê 33 û ji nav
kelehê, ji şivakeyekê[2] de di nava
zembîlekê de min berdan jêr û ji
destên wî reviyam.

*Têkiliyên bi rastî mirov pesnahiyê bidin*
4.Mûs 12,6-8; K.Şa 22,17; 1.Kor 2,3-5;
Ef 3,20-21

12 Ger ne bikêr[3] jî be, pesnve-
danî lazim[4] e; niha ez bêm
xuyaniyan û peyxamên ku min
ji Xudan ve girtiye. 2 Çardeh sal
berê, di Mesîh de (ez nizanim di
bedenê de, nizanim xeynî bedenê,
Xwedê dizane), heta bi ezmana
sêwemîn ve girtiye û hatiye birin,
ez bi zilamekî wusa dizanim. 3 Û
ez bi zilamekî wusa dizanim ku,
(di bedenê de, an jî xeynî bedenê,
ez nizanim, Xwedê dizane), 4 ber-
bi bihuştê[5] ve hate girtin û birin û
gotinên ku ne caiz e ji mirovan re
bête gotin û ji mirov re nayên gotin
bihîst. 5 Ez ê bi yekî ûsa re pesnê
xwe bidim. Lê belê di derheqê xwe
de, xeynî bêhêzbûna xwe, ez pesnê
xwe bi tiştekî din nadim. 6 Ji ber
ku ger ez pesnvedanê bixwazim, ez
nabim bêaqil; ji ber ku ez dê rasti-
yê bibêjim. Lê belê bona ku tu kes,
min ji dîtina xwe, an jî bihîstina
xwe bilindtir nebîne ez nawêrim ku
pesnê xwe bidim.
7 Û bona, ji mezinbûna pey-
xaman ez bi kubrê ve nekevim,
di bedenê de kelemek, bona ku
min kulmik bike milyaketekî
Îblîs dan min, da ku, ez bi kubrê
ve nekevim. 8 Bona ku ji min
veqete, ji bo vêya sê carî lava ji
Xudan re kirim. 9 Û wî ji min re
got: Kerema min ji te re bes e; ji
ber ku hêza min, di lawaziyê de
diçe serî! Ji ber vê yekê, ez ê hîn
jî zêde bi bêhêzbûna xwe pesnê
xwe bidim, da ku, hêza Mesîh li
ser min dakeve. 10 Ji ber vê yekê,
ez di oxra Mesîh de ji lawaziyan
re, ji gazinan re, ji pêwistiyan re,
ji zilman û tengasiyan re razî me;

---

[1] Civakên bawerkiran.
[2] Pacerê, pencere.
[3] Bifeyde, feydedar.
[4] Pêwist, hewce.
[5] Cenetê.

ji ber ku ez çi demê lawaz bim,
wê demê ez xwurt im.

*Karên Şagirtên rasteqîn*

2.Kor 11; 13,1-10

11 Ez bêaqil bûm; we min mecbûr
kirin; ji ber divê ku ez ji aliyê we
ve bihatima salix dan; lewma
her çiqas ez ne tiştek bim jî, ji
şagirtên herî sereta, di tu tiştekî
de kêmasiya min nîne. 12 Di nava
we de elametên[1] şagirtiyê, bi seb-
ra bitûmî, bi nîşanan, bi nuwaze-
yan û bi karên biqûdret ve hatin
xuyanî kirin. 13 Ji ber, xeynî ku
ez li we nebûm bar, çi kêmasiya
we ji Dêrên din heye? Vê neheqi-
yê ji min re bibexşînin!
14 A vay, ev cara sêwemîn e ku,
bona hatina cem we ez amade me
û ez ê li we nebim bar; ji ber ku
ez ne yê di we de ye, lê ez li we
digerim; ji ber ku divê ne zarok
bona dayik û bavên xwe, lê belê
dayik û bav bona zarokên xwe
xezînê berhev bikin. 15 Û ez ê
di oxra canê we de, malê xwe jî,
xwe jî bi kêfxweşiyek mezin xerc
bikim. Ger ez hîn jî zêde ji we hez
bikim, qey ez ê hîn jî kêm bêm
hez kirin? 16 Bila ûsa jî be, ez ji
we re nebûm bar; lê belê ji ber ez
fenek im, min we bi fenekiyê bi
dest ve xistin! 17 Gelo bi zilamên
ku min ji we re şandine, bi nav-
gîniya yekî ji wan min keda we
xwar? Ma Tîtûs keda we xwar?
Ma em di eynî ruhî de negeriyan
û li pey eynî rêyî neçûn? 18 Min
Tîtûs, bona hatina cem we teşwîq
kir û bira bi wî re şandim.
19 Qey hûn difikirin ku ewqas
dem e, em xwe li ber we diparê-
zin? Em li ber rûyê Xwedê bi aid-
bûna xwe yî Mesîh ve diaxifin.
Û hemû tiştan, ya xoşewîstno, ji
bona pêşveçûna we ne. 20 Ji ber
ez ditirsim ku, dema ez bêm bi
avayekî, we mîna xwestina xwe
nebînim; ez ê jî ji aliyê we ve,
wekî xwestina we neyêm dîtin;
dê bi avayekî hebûna keftûleftî,
çavnebarî, hêrs, azweriyên xwe-
perestî, îftira, paşbêjî, serxweçûnî
û tevliheviyê bête dîtin; 21 bi vî
awayî dema ez dîsa werim cem
we, dê Xwedayê min, min li ber-
ya we şermezar bike û ez ê bona
gellek kesên ku berê guneh kirine,
ji pîsitî û ji zînayê û ji kêfdariyê
tobe nekirine, şînê bigirim.

*Silav û îkazên dawîn*

2.Kor 12,19-21; 10,1-11

13 Ev cara sêwemîn e ku ez
têm cem we. Divê her gotin
bi şahdeyiya du an jî sê şahdeyan
ve bête rastî kirin! 2 Dema berê,
gava ez cara duwemîn di nava we
de bûm, ji hemûyên berê guneh
kirine û ji yên derveyî wan mane
re gotibûm; niha li dûrî we me-

[1] Delîlên

dîsa dibêjim: Ger ez dîsa werim,
ez naparêzim! 3 Ji ber ku hûn bir-
hanên[1] di derheqê axaftina Mesîh
de, ya bi navgîniya min ve dixwa-
zin; yê li dijî we ne bêhêz, lê belê
di nava we de bihêz e. 4 Ji ber ku
ew di nava bêhêziyê de hate xaç-
kirin, lê belê bi qudreta Xwedê ve
dijî. Ji ber ku em jî di wî de bêhêz
in, lê belê bi saya qudreta Xwedê,
em ê bi wî re bona we bijîn.
5 Bona, ka gelo hûn di baweriyê
de ne, xwe bi xwe biceribînin,
xwe azmûn bikin! An jî ma qey
hûn di derheqê xwe de nizanin
ku, ger hûn ne qewirandî bin Îsa
Mesîh di we de ye? 6 Lê belê ez
hêvî dikim ku, hûn ê fêhm bikin
em ne yên hatine qewirandin in[2].
7 Û bona ku hûn tiştekî xerab ne-
kin, em ji Xwedê re dua dikin; ev
jî ne bona ku em bi meqbûlî bêne
xuyanî kirin, lê em mîna yên ku
hatine qewirandin bibin jî, bona
hûn ya ku qenc e bikin in. 8 Ji ber
ku em ne li dijî rastiyê, lê dikarin
di oxra rastiyê de tiştekî çêbikin.
9 Ji ber ku kengî em bêhêz û hûn
bihêz bin, em kêfxweş dibin;
bona rayedarbûna we jî em dua
dikin. 10 Û rayedariya ku Xudan
ne bona têkbirinê, bona pêş ve bi-
rinê daye min, bona ku dema ez
werim cem we hewceyê bi hişkî
şuxulandina wan nemînim, hîn ez
ne di nav we de bim, van tiştan
dinivîsînim.
11 Ya dawîn, di xweşiyê de
bimînin, ya birano. Kêfxweş bin,
bona kemalê[3] xîretê bikin, guh
bidin banga min, di ramanên xwe
de yek bin, di nava dilxweşiyê
de bin û dê Xwedayê hezkirin
û dilxweşiyê bi we re be! 12 Bi
ramûsana pîroz ve silavê li hev û
din bikin! 13 Hemû pîrozan sila-
vê li we dikin. 14 Bila xêra[4] Xu-
dan Îsa Mesîh û hezkirina Xwedê
û şirîkantiya[5] Ruhê Pîroz bi we
hemûyan re be! Amîn.

1 Elametên, delîlên.
2 An jî: Em rastî bêserfiraziyê nehatine.
3 Gîhaştî, aqilkemal
4 Qencî, kerem, an jî:Lutif.
5 Pevrebûna, yekitiya.

# NAMEYA PAWLOS YA JI GALATIYAN RE

## MA KEDA MIROVAN E, AN DIYARIYA XWEDÊ YE?

*Pêşgotin*

Kesê ku nameyê bi peyxama Xwedê ve nivîsandiye, Nûçevan Pawlos e. Ûsa tê fikirîn ku name, di salên 55-60'an de ji Romayê ve hatiye nivîsandin. Galatya, herêmeke herî fireh bû û Enedola navîn jî tevî wê bû.

Name, bi wesîqeya Azadiyê ya girtiyê (bawerkirê) Mesîh ve tê nasîn. Hewcedariya bingehîn, bawerkirina Mesîh û ji aliyê Xwedê ve, bi rastiyê xemilandin e (3:11). Xelat, mirovan ji her têkiliyên kevneşopî û şiklî ve azad dike (1:6). Hunerê xelaskirina Zagona Ruhanî nîne. Bapîrê me Birahîm jî li gor sereta baweriyê bi rastiyê ve hatibû xemilandin (2:15-5:6).

Pawlos dide xuyakirin ku Nûçeya Kêfxweşiyê, ne îcada mirovan e û ji Xwedê ve hatiye (1:10-16; 1:17-2:14).

Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Parastina nûçevanê Xwedê 1:1,2-2:21
2. Rastiyên di derheqê baweriyê de 3:1-4:31
3. Bingeha azadiyê Ruh e 5:1-6:10
4. Dawî 6:11-18

*Destpêk û silav*

Rom 1,1-7

1 Ne ji mirovan, ne jî bi navgî-
niya mirovan, lê bi navgîniya
Îsa Mesîh û Bav Xwedê, yê ku
wî ji miriyan vejandiye, bi şagirtî
hatiye tayîn kirin, ji min Pawlos
2 û ji hemû birayan, yên ku bi
min re ne, ji Dêrên[1] ku li Galati-
yêne re: 3 Bila ji Bavê me Xwedê
û ji Xudanê me Îsa Mesîh, yê ku
li gor viyana[2] Bavê me û Xwe-
dayê me, bona me ji dema nihayî
xerab xelas bike, 4 xwe bona gu-
nehên me daye, xêr û xweşî ji we
re be; 5 bila heta bêdawiyan ji
Xwedê re bilindahî be! Amîn.

*Mizgînek din tune*

Gal 3,1-5; 4,9-20; 5,1-12; 2.Kor 11,4

6 Ez ecêb dimînim ku hûn, yê ku bi
xêra Mesîh bangî we kiriye berdi-

1 Civakên bawerkiran.

2 Daxwaz, îrade.

din û ewqas bi lezî vedigerin miz-
gînek din; 7 bi rastî mizgînek din
tune ye; lê belê kesên dixwazin ku
aqlê we tevlihev bikin û Mizgîniya
Mesîh bişewşînin hene. 8 Lê belê
ger em an jî milyaketekî ji ezman,
çewtî Mizgîniya ku me ji we re waz
kiriye mizgîniyek din ji we re waz
bike, bila nalet li wî be! 9 Çawa
ku me berê gotibûn, niha jî dîsa
dibêjim: Ger kesek ji we re, li dijî
Mizgîniya ku we qebûl kiriye miz-
gîniyek din waz bike, bila nalet li
wî be! 10 Ji ber ku niha, ma gelo ez
li riza mirovan, ya na li riza Xwedê
digerim? An jî qey ez bona xoşnûd
kirina mirovan dişuxulim? Ger
min hîn jî xoşnûd kirina mirovan
bixwesta, ez nedibûm qûlê Mesîh.

*Pawlos dibe Şagirtê Mesîh*

K.Şa 9,1-20; 22,3-16; 26,9-20

11 Birano, ez dixwazim ku hûn
jî bizanin, Mizgîniya ku ji aliyê
min ve hatiye waz kirin, ne li hev
anîna mirovan e. 12 Ji ber ku min
wê[1] ji mirovan ve negirt û nehatim
hîn kirinê; lê belê bi peyxama Îsa
Mesîh ve stendim. 13 Ji ber ku we
ji jiyana minî berê, ya di Cihûdîti-
yê de bihîstiye; heta ku tu bibêje
min zilmê li Dêra Xwedê dikir û
wê dişkenand û derbas dikirim.
14 Di parêziya kevneşopên bapîrê
xwe de, bi sertaybetî bi xîret û di
Cihûdîtiyê de ji gellekên temen-
darê xwe gellekî di pêş de bûm.
15 Lê belê Xwedanê ku hîn ez
di rehma dayika xwe de bûm
min bijart û bi xêra xwe bangî
min kir,· 16 gava bona ku ez di
nav netewan de wî waz bikim,
razî bû ku Lawê xwe nîşanî min
bide, ez hema bi xwînê û goşt[2] re
neşêwirîm 17 û neçûm Orşelîmê,
cem yên berî min şagirtiyê dikirin
jî; lê belê çûm Erebîstanê û dawi-
yê dîsa vegeriyam Şamê.
18 Sê sal li pey vêya, bona ku bi
hev re nasîna Kîfas çûm Orşelîmê
û panzdeh roj li cem wî mam.
19 Lê belê min kesî ji şagirtên din
nedît; tenê birayê Xudan, Aqûp
dîtim. 20 Û di tiştên ku ji we re
dinivîsim de, a vay, ez li ber Xwe-
dê derew nabêjim. 21 Pişt re ez
hatim herêmên Sûrî û Kîlîkyayê.
22 Û Dêrên Cihûstanê yên di Mesîh
de ne, min bi xwe nas nedikirin.
23 Û tenê vêya bihîstibûn: Zilamê
ku demekî zilmê li me dikir, ba-
weriya berê dixwast ku xera bike,
niha waz dike! 24 Û bi vî awayî, ji
bo min Xwedê bilind dikirin.

*Pêtrûs, Aqûp û Yûhena Şagirtiya Pawlos qebûl dikin*

K.Şa 15,1-29

2 Çardeh sal pişt re, min Tîtûs jî
girt cem xwe û tevî Barnabas

---

1 Mizgînî.

2 Bi mirovan re.

ez dîsa çûm Orşelîmê. 2 Û ez li
gor peyxamê derketim û bona ku
ez bi avayekî di valahiyê de baz-
nedim, an jî nebe ku bazdabım, ji
wan re, lê belê tenê bona yên birêz,
Mizgîniya ku di nava neteweyan
de waz dikim, pêşkêşî wan kirim.
3 Lê belê heta Tîtûsê bi min re bû
jî, li berya Grekbûna wî, bona su-
netbûnê zorê nedanê. 4 Çi heye ku,
hinek birayên sexte hebûn ku bona
bi dizîka hînî azadiya ku em di Îsa
Mesîh de xwediyê wê ne, bibin û
me dîl bixînin bi dizîka ketibûn
nava me. 5 Bona ku rastiya Mizgî-
niyê her tim bi we re bimîne, sae-
tekî jî me histu ji wan re xwar nekir
û me xwe neda destê wan.
6 Lê belê yên pêş dihatin – çibûna
wanî berê, li gor min ne girîng e,
Xwedê di nava mirovan de cihêti-
yê nake – ev kesên pêşî tên, tu
tiştekî ji min re nedan hînkirin.
7 Lê li dijberiya vêya, çawa ku
karê têgihandina Mizgîniyê ya ji
bisunetiyan re dane Petrûs, dîtin
ku têgihandina bêsunetan jî ji min
re hatiye dayînê[1]. 8 Ji ber ku yê
bona ji bisunetiyan re şagirtiyê
bike, di Petrûs de çalak e, bona ji
neteweyên din re şagirtiyê bikim
di min de jî çalak bû 9 û yên ku
sitûn dihatin hesibandin, Aqûp,
Kîfas û Yûhena, dema bi xêra ji
min re hatiye bexşandin hesiyan,
bona me çûyîna neteweyên din,
bona xwe jî çûna Cihûdan li cîh
dîtin; bi nîşana pevrebûna me des-
tê xwe yî rastê dirêjî min û Barna-
bas kirin. 10 Lê bîranîna xizanan
jî ji me xwestin û min jî xîret kir
ku vêya bi tûmî bînim cîh.

*Pawlos li Antaqyayê bi*
*Pêtrûs ve dipeke*

K.Şa 11,1-18; 15,7-11;
Gal 3,10-14; 3,24-28; 5,1-6

11 Lê belê dema Kîfas hate An-
taqyayê, ji ber ku biqebehet bû,
min bi eşkeretî dijraberiya wî kir.
12 Ji ber, berî ku hinek mirov ji
cem Aqûp bên, wî bi kesên ji ne-
teweyên din ve xwarin dixwar; lê
belê dema ew hatin, ji yên bisu-
netê ve tirsiya û ji cem bêsunetan
ve vekişî.
13 Û Cihûdên din jî mîna wî
durûyî kirin; ûsa ku, Barnabas
jî bi durûyiya wan ve ket. 14 Lê
belê dema min dît ku li gor rasti-
ya Mizgîniyê ve nakin, li pêşiya
hemûyan min ji Kîfas re got: Tu
bi Cihûdbûna xwe, ne mîna Cihû-
dan, mîna neteweyên din dijî;
çawa dibe, tu zorê didî mirovên
din ku bona bibin Cihûd?

*Mizgîniya Xwedê bona her kesî ye*

Rom 3,21-30; 6,4-11

15 Ne gunehkarên neteweyên din,
em, yên ku bi bûyînê ve Cihûd in;

---
1 An jî: Ji min re hatiye spartin, hatiye emanet kirin.

16 bona ku em dizanin mirov, ne
bi karên zagonê, lê bi baweriya ji
Mesîh Îsa ve dike salih[1] têtê hesi-
bandin; me jî bawerî bi Îsa Mesîh
anîn; da ku, ne bi karên zagonê,
bona ku em di baweriya Mesîh de
salih bên hesibandin; ji ber ku tu
kes ji karên zagonê ve salih neyên
hesibandin. 17 Lê belê ger dema em
di Mesîh de salih hatibin hesiban-
dinê digerin, em bi xwe bi guneh
derkevin, di wê rewşê de ma qey
Mesîh xizmetkarê guneh e? Haşa!
18 Ji ber ku ger bona ava kirina
tiştên ku xera kirime bixebitim, ez
ê zagon xera kirina xwe di bîr de
bînim. 19 Ji ber, bona ku ez ji bo
Xwedê bijîm, bi navgîniya zagonê,
li berya zagonê mirim. 20 Ez tevî
Mesîh hatim xaç kirin û êdî ez na-
jîm, lê belê Mesîh di min de dijî û
niha jiyana ku di bedenê de dijîm,
bi baweriya ku ji Lawê Xwedê, yê
ji min hez dike û di oxra min de
xwe radest kiriye ve dijîm. 21 Ez
xêra Xwedê bê derbasî nahêlim;
ji ber ku ger pakbûn[2] bi navgîniya
zagonê ve bihata qezenc kirin, wê
demê Mesîh berhewa[3] miriye.

*Zagona Pîroz û bawerî*

Rom 3,19-4,25

3 Ya Galatiyên bêaqil! Ma kî
sêhrê li we kir, li yên ku rasti-
yê guhdarî nakin, li yên ku di naw
wan de bi xaç kirina Îsa Mesîh li
ber çavên we hatiye pêşdarî kirin,
kiriye? 2 Ez tenê dixwazim ji we
hînî vêya bibim: Gelo we Ruh
bi karên zagonê, ya na bi agahi-
ya baweriyê ve girtin? 3 Ma hûn
ewqas bêaqil in? Ma qey li pey bi
Ruh ve destpêkirinê, niha jî hûn
dixwazin bi bedenê ve biqedînin?
4 Ma li cîhê vala we ewqas keser
kişandin? Bi rastî jî ji valahiyê re
bû? 5 Niha yê ku Ruh bexşî we
kiriye û di nav we de karên bi-
qudret kiriye, gelo vêya bi karên
zagonê, an jî bi agahiya baweriyê
ve kiriye?

6 Çawa ku Birahîm bi Xwedê
bawerî anî û jê re pakbûn[4] hate
hesibandin. 7 Wê demê vêya bi-
zanibin ku, zarokên Birahîm, yên
ku baweriyê anîne ne. 8 Û Nivîsa
Pîroz, ji berê ve dît ku dê Xwedê
neteweyên din, li gor baweriya
wan salih bihesibîne û mizgîniya:
Dê hemû netewe di te de pîroz bi-
bin[5], ji berê ve da Birahîm. 9 Bi
vî awayî yê bawerî anîne, dê bi
Birahîmê ku bawer kiriye re bêne
pîroz kirin.

10 Ji ber, hemûyên ku ji karên
zagonê ve ne, di binya naletê de
ne. Ji ber ku hatiye nivîsandin:
Her mirovê bona ku hemû tiştên

1 Rast.
2 Başbûn, an jî: Rastiya Xwedê.
3 Li cîhê vala.
4 Başbûn, an jî: Rastiya Xwedê.
5 (1.Mûsa 12:3)

di pirtûka zagonê de hatiye nivî-
sandin bîne cîh, di wan de namîne
bi nalet e[1]. 11 Eşkere ye ku, tu kes
di qatê Xwedê de bi zagonê ve sa-
lih nayê hesibandin; ji ber ku: Dê
yê rast bi baweriyê ve bijî[2]. 12 Û
zagon ne ji baweriyê ye; lê belê:
Yên ku wana bikin, dê bi wana ve
bijîn[3]. 13 Bona pîrozkirina ku ji
Birahîm re hatiye dayîn, bi navgî-
niya Mesîh Îsa ve ji neteweyên din
re jî bê dayîn û em bi navgîniya
baweriyê ve Ruhê ku hatiye wad
kirin bigirin, 14 Mesîh di oxra me
de hate nalet kirin û me ji naleta
zagonê ve xelas kir; ji ber ku hati-
ye nivîsandin: Heçî kesên ku li ser
darê ve daliqîne binalet in[4].

*Wada Xwedê û Zagona Pîroz*

Mîk 7,20; K.Şa 3,25-26;
Rom 4,13-17; 10,4-13; Ef 3,6

15 Birano, ez li gor mirovan
dibêjim: Di nava mirovan de çê-
bibe jî, ger peymanek hatibe tes-
dîq kirinê, kes nikare vêya betal
bihesibîne û nikare tiştekî tevî
vêya bike. 16 Lê belê niha, wad ji
Birahîm re û ji nîjada wî re hatine
dayîn. Û mîna ku ji bo gellek kesî
re be: Û ji nîjadan re nîne; lê belê
wekî ku bona yek kesî be: Û ji nî-
jada te re[5], dibêje ku, ev jî Mesîh
e. 17 Lê belê ez vêya dibêjim:
Zagona ku çar sed sal ji pişt re
hate; nikare peymana ku Xwedê
ji berê ve tesdîq kiriye betal bike,
nikare wadê ji navendê ve rake.
18 Ji ber ku ger mêras ji zagonê
ve be, êdî ne ji wadê ye; lê belê
Xwedê wê bi wadê ve ji Birahîm
re bexşandiye.
19 Wê çaxê zagon ji bo çi ava bû?
Heta ku nîjada ji wî re hatiye wad
kirin were, wekî bi navgîniya mil-
yaketan, bi destê navberek hatibe
rêz kirin be; ji ber sûcan hate tev-
lêkirin. 20 Û navber ne yê yekî
ye; lê belê Xwedê yek e.

*Armanca Zagona Pîroz û Mesîh*

Gal 3,23-26; Rom 8,14-17

21 Niha, qey zagon dijraberê wadên
Xwedê ye? Haşa! Ji ber, ger zago-
nekî bikara ku bivejîne bida dayîn,
bi rastî dê mirovan bi zagonê ve
bihatina pak kirin. 22 Lê belê bona
ku wad ji yên ku baweriya xwe bi
baweriya ji Îsa Mesîh re anîne bête
dayîn, Nivîsa Pîroz hemû tiştan di
bin gunehê de girt.
23 Lê belê berî ku bawerî bê, em
bona baweriya ku dê bête kişif ki-
rin, wekî girtî bin, di bin zagonê
de dihatin parastin. 24 Wusa ku,
bona em bi baweriyê ve salih bêne
hesibandin, zagon bona Mesîh, bû
perwerdekarê me. 25 Lê belê ji bo

1 (5.Mûsa 27:26)
2 Habaqûq 2:4
3 (3.Mûsa 18:5)
4 (5.Mûsa 21:23)
5 (1.Mûsa 13:15)

ku bawerî hatiye, em êdî ne di bin perwerdekar de ne. 26 Ji ber ku hûn hemû bi navgîniya baweriyê ve di Mesîh Îsa de lawên Xwedê ne. 27 Ji ber ku hûn hemû, yên ku di Mesîh de[1] vaftîz bûne, we Mesîh li xwe kirine. 28 Ne Cihûd, ne jî Grek heye, ne qûl, ne jî azad heye, ne jî mêr û jin heye; ji ber ku di Mesîh Îsa de hûn hemû yek in. 29 Û ger hûn yên Mesîh bin, wê demê hûn ji nîjada Birahîm in, li gor wadê mêrasgerê wî ne.

4 Lê belê ez dibêjim: Ger mêrasger xwediyê her tiştî jî be, heta ku zarok be, ji dîlekî ne bi ferq e[2]; 2 lê belê heta dema ku Bavê wî bijartiye, di bin çavnêriya wasî û wekîlan de ye. 3 Mîna vêya, em jî dema zarok bûn, dîlê di binya rageze serekînê dinê de dijîn bûn; 4 lê belê wexta dem tijî bû, bona ku yên di bin zagonê de xelas bike, 5 Xwedê, Lawê xwe yê ku ji pîrekê ve bûyiye, yê ku di bin zagonê de bûyiye şand; da ku, em mafê lawitiyê bigirin. 6 Bona ku hûn law in, Xwedê Ruhê Lawê xwe yê bi gotina: Abba, Bavo! bang dike şand dilên we. 7 Bo vê sedemê êdî hûn ne dîl in, lê law in û ger ku hûn law in, him jî bi navgîniya Mesîh ve mêraskerê Xwedê ne.

*Xemên Pawlos yên bona Galatiyan*

Kol 2; 2.Kor 11,1-4; 11,13-15

8 Lê belê wê demê we bi Xwedê nizanîbûn û bi xwezayî ji yên ku ne îlah in re qûlitiyê kirin; 9 lê belê niha jî piştî ku we Xwedê nas kirin, ya rastî, hûn ji aliyê Xwedê ve hatin nas kirin; çawa dibe ku hûn dîsa vedigerin van ragezên bêbandûr[3] û bêrûmet û dixwazin dîsa ji vana re bibin dîl? 10 Hûn bi rojan û mehan û demsalan û salan digirin! 11 Bona ku, ez ji bo we bi awayekî vala nexebitîbim, ez ji bo we ditirsim.

12 Birano, li ber we digerim, bibin mîna min; ji ber ku ez jî bûm mîna we! We tu neheqiyê li min nekirin; 13 lê belê hûn dizanin ku, min Mizgîniyê cara pêşîn di lawaziya bedenî de ji we re waz kir 14 û rewşa bedena min bona we ceribandinek bû û we min biçûk nedîtin û red nekirin; lê belê we min mîna milyaketekî Xwedê, mîna Mesîh Îsa, qebûl kirin. 15 Ma niha ji wê dilxweşiya we re çi bû? Ji ber ku ez bona we şahdeyiyê dikim ku, ger ji destê we bihata, we yê çavên xwe bikolana û bidana min. 16 Nexwe, qey bona ku min gotina rast ji we re got, ez bûm neyarê we?

17 Ew di derheqê we de xîretê dikin, ne bi nêta qenc; lê belê bona

1 ...ji Mesîh re.

2 Ji qûlekî ne cihê ye.

3 Bêtesîr.

ku hûn ji bo wan xîretê bikin, di-
xwazin we li derve bihêlin. 18 Lê
belê ne tenê ger dema ez li cem
we bim, her tim bixîret bûn qenc
e. 19 Zarokên min; heta ku Mesîh
di we de tişê[1] bigire, dîsa bona
we jana welidandinê dikişînim;
20 lê belê min dixwest ku ez niha
li cem we bim û awaza dengê xwe
biguherînim; ji ber ku ez di der-
heqê we de dudilî me!

*Mînaka Sara û Hacirê*

1.Mûs 21,8-12; Îbr 12,18-24

21 Ya hûn, yên dixwazin ku di bin
zagonê de bin, ji min re bibêjin: Ma
qey hûn zagonê nabihîzin? 22 Ji
ber ku bi gotina du lawên Birahîm
hebûn, yek ji cariyê û yek ji pîreka
azad, hatiye nivîsandin. 23 Lê belê
yê ku ji cariyê bûye li gor bedenê û
yê ku ji pîreka azad ve bûye, li gor
wadê welidiye. 24 Li vir wekhev
kirinek heye; ji ber ku ev pîrekana
nîşana du peymanê ne; yek ji Çi-
yayê Sînayê ye, dê zarokên bibe dîl
bibin; ew Hacirê ye. 25 Û Hacirê,
Çiyayê Sînayê li Erebîstanê nîşan
dide û beramberê Orşelîma niha ye;
ji ber ku bi zarokên xwe re dîlitiyê
dike. 26 Lê belê Orşelîma ezmanî
azad e, dayîka me ew e. 27 Ji ber
ku hatiye nivîsandin: Ya stewra ku
nawelidîne, şa bibe!
Hê ya ku bi jana zayînê nizane, bi
şabûnê biqêre!
Ji ber, zarokên pîreka ku hatiye
berdan, ji zarokên ya bi mêr zê-
detir in[2].
28 Û em, birano, mîna Îshaq za-
rokên wadê ne. 29 Lê belê yê ji
rêya taybetî ve bûye, çawa ku
wê demê li yê li gor Ruh ve bûye
zilmê dikir, niha jî ûsa dibe. 30 Lê
belê Nivîsa Pîroz dibêje çi?
Pîreka dîl û lawê wê bavêje derve!
Ji ber ku lawê pîreka dîl, dê bi lawê
pîreka azad ve mêrasê negire[3].
31 Bo vê yekê, ya birano, em ne
zarokên cariyê, lê belê zarokên
pîreka azad in.

*Azadiya xwe yî di Mesîh de ye biparêzin*

Rom 7,1-6; Gal 2,3-5; 2,15-21;
K.Şa 15,1-31

5 Mesîh bona azadiyê me azad
kir; niha di azadiyê de pêdan-
dî[4] bimînin û carekî din bi nîrê
qûlitiyê ve neyên girtin!
2 A vay, ez Pawlos, ji we re
dibêjim: Ger hûn sunet bibin, tu
bikêr hatina Mesîh ji we re nabe.
3 Ez her zilamê ku sunet dibe, ca-
rek din îkaz dikim: Mecbûr e ku
hemû zagonê bîne cîh. 4 Ya hûn,
yên ku dixwazin di zagonê de
bêne salih kirin, hûn ji Mesîh ve

1 Qudim, şikil.
2 Îşaya 54:1
3 (1.Mûsa 21:10,12)
4 Sabît.

veqetiyan, ji xêrê ketin! 5 Lê belê
em bi spartina Ruh û bi baweriyê
li benda çêbûna hêviya ku pakbûn
daye me ne. 6 Ji ber ku di Mesîh
Îsa de, ne bisunetbûn, ne jî bêsu-
netbûn; lê baweriya ku bi hezki-
rinê ve çalak e; ji karekî re dibe.
7 We qenc baz didan; ma kî nehişte
ku hûn ji rastiyê re îtaetkar bin?
8 Xapandina we, ne ji yê bangî
we kiriye yî! 9 Hindikek havên
hemûya hevîrê tirş dike. 10 Di Xu-
dan de ez bi we ewle me ku, hûn
bi tewrek din nafikirin; lê belê yê
ku aqilê we tevlîhev dike, kî bibe
bila bibe, dê cezê xwe bikişîne.
11 Lê belê gava em bên min,
ya birano, ger min hîn sunetê
biparêsta, ma ez ê heta niha biha-
tima fetilandin? Wê çaxê tilpekiya
xaçê hatiye betal kirin! 12 Yên ku
aqlê we tevlihev dikin, qet nebe
bila xwe bixesînin!
13 Ji ber ku, ya birano, hûn bona
azad bûnê hatin bang kirin; lê bila
azadî ji bedenê re nebe fersend; lê
belê bi hezkirinê xizmetê ji hev
û din re bikin. 14 Ji ber ku hemû
zagon di gotinekê de hatiye kurte
kirin: Ji cîranê xwe mîna xwe hez
bike[1]! 15 Lê belê ger hûn dev li
hev dikin û dixwin, bala xwe bi-
dinê ku hûn ji aliyê hev û din ve
neyên telef kirin!

*Ezitiya xweza û Ruhê Pîroz*

Rom 8,1-14; Ef 5,1-12; Kol 3,5-15

16 Lê belê ez dibêjim: Di
rêvebiriya Ruh de bijîn û wê demê
hûn tu carî xwestinên bedenê[2]
naynin cîh. 17 Ji ber ku beden
yê dijberê Ruh, Ruh jî yê dijberê
bedenê dixwaze û bona ku hûn
tiştên ku dixwazin mekin, vana
dijberê hev in. 18 Lê belê ger hûn
di rêvebirtiya Ruh de bin, dibe ku
hûn ne di binya zagonê de bin.
19 Lê belê karên bedenê eşkere
ne; ew: Zîna, pîsitî, şehwet,
20 pûtperestî, sêrbazî, neyartî,
keftûleft, çavnebarî, hêrs, az-
weriyên ezperestî, cudabûnan,
parvebûnan, 21 hesûdî, mêrku-
jî, serxweşî, kêfkirinên bi harî û
tiştên mîna vana ne. Mîna ku min
berê gotibû, di derheqê vana de
ji berê ve dibêjim, yên ku tiştên
ûsa bikin, dê nikaribin Serweriya
Xwedê mêras bigirin.
22 Lê belê mêwa Ruh hezkirin,
kêfxweşî, aştî, sebir, dilovanî[3],
qencitî, dilsozî, 23 xûnermî û
xwekontrol e[4]; li dijî tiştên ûsa
zagon nîne. 24 Û yên aidî Mesîh
Îsa ne, ezitiya xweza tevî az-
werî û xwestinên wê, xaçkirin e.
25 Ger em di Ruh de dijîn, di
Ruh de jî bimeşin. 26 Em nebin
yên ku bi valahiyê ve pesnê xwe

*1* (1.Mûsa 19:18)
*2* Ezitiyê.
*3* Piyarî, an jî: Şefqet.
*4* Xwepişkinan, an jî: Bi nefsa xwe karîn, (girtin).

vedidin, meydanê li hev û din di-
xwazin, yên çavnebariyê li hev û
din dikin!

*Di Dêrê de jiyana Ruhanî*

Rom 12,9-21; 15,1-7

6 Birano, ger kesek dema sûcki-
rinê bê girtin, hûn yên ruhanî,
kesê ûsa bi ruhekî nerm bînin rê
û bona ku tu jî neyê xapandin, li
xwe miqate bibe! 2 Barên hev û
din bikişînin[1] û bi vî awayî hûn ê
zagona Mesîh bînin cîh! 3 Ji ber
ku dema kesek ne tiştek be û xwe
bi tiştekî bihesibîne, dibe ku xwe
dixapîne. 4 Lê belê bila her kes
karê xwe biceribîne û wê demê
dikare ne bi kirinên kesên din,
lê tenê bi kirinên xwe pesna xwe
vede. 5 Ji ber ku dê her kes barê
xwe bikişîne.
6 Lê belê yê ku di kelamê de hati-
ye fêrkirin, bila di hemû tiştan de
parê bide fêrmend!
7 Nexapin; Xwedê nayê qerf ki-
rinê! Ji ber ku mirov çi biçîne, dê
wê jî bidirûnîne. 8 Ji ber ku yê li
bedena xwe ve biçîne, dê ji bedenê
ve mirinê bidirûnîne; lê belê yê li
Ruh ve biçîne, dê jiyana bêdawî
ji Ruh ve bidirûnîne. 9 Lê belê
em ji qencîkirinê ve eciz nebin; ji
ber ku ger em sist nebin, em ê di
demsala wê de bidirûnînin. 10 Bo
vê yekê hîn ku fersenda me heye,
ji her kesî re, bi taybetî jî ji en-
damên malbata baweriyê re qen-
ciyê bikin.

*Xaça Mesîh û afirandina nû*

Fîl 3,2-21; Gal 5,5-10

11 Binihêrin, ji we re ez bi destê
xwe, bi çi tîpên mezin dinivîsî-
nim! 12 Yên di bedenê de girîn-
giyê didin şaniyê, sirf bona ku li
oxira xaça Mesîh zilmê nebînin,
zorê didin we ku hûn sunet bibin.
13 Ji ber ku heta yên bisunet jî
zagonê naynin cîh; lê belê bona
ku bi bedenên we ve pesnê xwe
vedin, dixwazin hûn sunet bibin.
14 Dema em bên min, ez xeynî
xaça Xudanê me Îsa Mesîh, bi tu
tiştê din ve pesnê xwe venadim; bi
navgîniya xaça wî, dinya bo min
mirî ye û ez jî bona dinê. 15 Ji ber
ku di Mesîh Îsa de qet girîngiya
bisunetbûn, an jî bêsunetbûnê
tune ye, ya girîng afirandina nû
ye. 16 Bila ji hemû kesên mîna vê
qaîdê dikin û ji Îsraêla Xwedê re
dilxweşî û dilovanî bibe!
17 Ji niha pê ve bila tu kes zeh-
metê nede min; ji ber ku ez,
nîşanê birînên Îsa di bedena xwe
de dikişînim. 18 Birano, bila xêra[2]
Xudanê me Îsa Mesîh bi ruhê we
re be! Amîn.

---

1 Hilgirin.

2 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA JI EFESIYAN RE

YEKÎTIYA CIVAKA BAWERKIRAN

*Pêşgotin*

Yê vê nameyê bi peyxama Xwedê ve nivîsandiye, Nûçevan Pawlos e. Pawlosê dema li Romayê bindest bû vê nameyê nivîsand, li wir, ji Kolosiyan, Fîlîpiyan û Fîlêmon re jî nameyan nivîsand. Dîroka nivîsandina vê nameyê tê nava salên 60-64'an. Serîdana Pawlos ya yekemîn li Efesê di Karên Şagirtan 18:18-21'an de, ya duwemîn jî di 19:2-7'an de hatiye nivîsandin. Naveroka xizmeta li vir, gellek bûyînên rewnaqî ye (K.Şa. 19:9-20,23-41; 20:17-35).

Di dema destpêka yekîtiya Dêran de bawerkirên ji Cihûdan û bawerkirên ji neteweyên din ve tên, ji ber ku hewcedariya yekîtiya girêdana Mesîh bîr nebirin, nivîsandina vê nameyê ferz bû. Babeta bingehîn ya nameyê di 4:13'an de eşkere dibe. Xwedê bi Mizgîniyê mirovan dighîne azadiya jiyanê (1:7,2:5,7-10). Armanca wî hemû sazûmana avayî, bigehîne yekîtiya di zaniyariya bitûmiya Mesîh de ye.

Bona dîsa çêbûna vê rastiyê binêrin, 1:1,3,6,12,15,20; 2:10,13; 3:11; 4:21. Xwedê wadên xwe, bi navdîtiya Ruhê Pîroz ve bi mor kiriye (1:13; 2:18,22; 3:16,4:3,4).

Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Pêşgotin 1:1-14
2. Girêdana Civakê ya bi jiyana di Mesîh de ye 1:15-3:21
3. Têkiliyên Civakê bi der û hêlê xwe ve 4:1-6:9
4. Bi xwestek kirin 6:10-24

*Destpêk û silav*

1 Ji Pawlosê ku bi viyana[1] Xwe-
dê bûye şagirtê Mesîh Îsa, ji
pîrozên li Efesê ne re û ji yên di
Mesîh Îsa de dilsoz in re: 2 Ji Bavê
me Xwedê û Xudan Îsa Mesîh ve
bila xêr û xweşî li we be!

1 Daxwaz, îrade.

*Cihêtiyên ku em di Mesîh de lê xwedî ne*

1.Pêt 1,1-5; 2.Sel 2,13-14; Rom 8,28-30; 2.Kor 1,19-22

3 Bila Xweda û Bavê Xudanê me
Îsa Mesîh, ê ku me di Mesîh de bi
her cûreyê bereketa ruhanî ve di
cîhê ezmanî de bi berdar kirine,
pîroz bibe. 4 Çawa ku li berya xwe,
bona ku em di hezkirinê de pîroz û

bêqisûr bin, wî berî ava kirina dinê
em di wî de bijartin. 5 Bi xwestina
xwe û li gor armanca xwe yî qenc,
bi navgîniya Îsa Mesîh ve, bona ku
em ji wî re bibin law, wî em ji berê
ve kifş kirin. 6 Ûsa ku, bila pesna-
hiya xêra wî yî bilind di Lawê xwe
yî xoşewîst de ji me re bexşandiye,
bê dayîn. 7 Bi saya dewlemendi-
ya xêra wî yî bi hemû zaniyarî û
fêhmkariyê ve li ser me zêde kiri-
ye, 8 em di wî de bi xwîna wî xwe-
diyê xelasiyê, bexşandina gunehên
xwe ne; 9 li gor riza xwe ya di wî
de pêşniyar kiriye, raza daxwaziya
xwe, 10 yanê, bona rêz kirina bitû-
miya wextan, ji me re daxuyanî kir
ku divê yên li ezman in û divê yên
li erdê ne, hemû tiştan dê di Mesîh
de bike yek; 11 li gor dîtina dax-
waziya xwe, li gor pêşniyara di her
tiştî de Afirkir e, wekî ji berê ve ha-
tibe pêşkêşî kirin, 12 bona ku em,
yên pêşiyê di Mesîh de hêvî kirine,
bona pesnahiya bilindahiya wî bin,
em di wî de beşdarvanên[1] mêrasê
hatin kirin; 13 hûn jî kelama ras-
teqîniyê, mizgîniya xelasiya we,
wekî di wî de bihîstibin û baweriya
xwe bi wî anîbin, bi Ruhê Pîroz yê
wadê ve hatin mohr kirin; 14 bona
xelasiya milkê wî, bona pesnahiya
bilindahiya wî, pêşîneka[2] mêrasa
me ew e.

*Duaya ji bo bawerkiran*

Kol 1,9-13; 2.Kor 4,6

15 Bona vêya ez jî, cergî min ba-
weriya we yî bi Xudan Îsa ve û
hezkirina ku hûn ji hemû pîrozan
re geş dikin bihîstiye, 16 bona we
bê sekin şikiryê dikim û her tim
we di duayên xwe de di bîr ve tî-
nim; 17 da ku, Xwedayê Xudanê
me Îsa Mesîh, Bavê Bilind, bila
ji bona ku hûn wî nas bikin, ruhê
zanyarî û peyxamê bide we; 18 da
ku, wekî çavên dilên we ronî bibe,
hûn hêviya bang kirina wî çî ye,
dewlemendiya bilindahiya mêrasa
wî yî di pîrozan de çî ye, 19 ji bo
me, yên ku bawerî anîne, li gor
pêkanîna hêza qudreta wî, bilin-
dahiya qudreta wî, ya pirr mezin
çî ye, fêhm bikin. 20 Vêya jî bi
hêza ku dema wî Mesîh ji mirinê
ve vejand û wî li aliyê xwe yî rastê
da rûniştin di wî de pêşkêş kir, di
eynî çalakiyê de ye 21 û wî[3] gel-
lekî derxist ser hemû rêvebirî û hi-
kumranî, hêz û serweriyan, ser her
navên ne tenê di vî çaxî de, lê belê
di çaxên bê de jî dê bên bîr kirin
ve 22 û her tiştî li binya lingên wî
raxist û bi wî ve girêdayî danî û
wî, bona ku li ser hemû tiştên hene
bike serî, da Dêrê; 23 ev jî, bedena
wî ye, tijî bûna yê her tiştî ji her alî
ve dadigre ye.

1 Gîhaştkerên.
2 Kapora, temînat.
3 Mesîh.

*Jiyana nû ya di Mesîh de, xêra Xwedê ye*
Kol 2,12-13; 3,1-3; Tît 3,3-8

2 Hûn jî, ji berya sûc û gunehên
xwe yî demekî tê de dijiyan,
mirî bûn; 2 hûn li pey yê li çûna
dinê û ruhê ku niha di lawên bêî-
taet de çalak e, yanê, li pey ser-
werê hikumraniya li hewayê ve
diçûn; 3 demekî em hemû ûsa,
di nava mirovan de bi cîh anîna
xwestekên bedenê û aqil, li gor
bedena xwe dijiyan û mîna yên
din, bi xwezayî em ji zarokên xe-
zebê bûn.
4 Lê belê Xwedayê dilovaniya wî
zêde ye, ji ber hezkirina xwe yî me-
zin, ya ku wî bi wê ji me hez kiriye,
5 gava em hîn di nav sûcên xwe de
mirîbûn jî, bi Mesîh re me vejand
– hûn bi xêrê ve xelas bûn! – 6 û
me, bi wî re vejand û di Mesîh Îsa
de li cîhên semawî da rûniştandin;
7 vêya, bi qenciya ku di Mesîh Îsa
de xuyayî me kir, bona bêdawîbû-
na dewlemendiya xêra xwe di
demên werin de pêşkêş bike kir.
8 Ji ber ku hûn bi rêya baweriyê, bi
xêrê ve xelas bûn û ev ne ji we, xe-
lata Xwedê ye. 9 Bona ku kes pes-
nê xwe venede, ne ji dawiya karan
e. 10 Ji ber, bona ku em di karên
qenc, yên ku Xwedê wan ji berê
ve amade kiriye de bimeşin, em
bona vana di Mesîh Îsa de avabûyî,
berhemên wî ne.

*Civaka Xwedê ya nû*
Kol 2,13-14; 1,20-22; Gal 3,28-29

11 Bona vêya bînin bîra xwe ku,
hûn, demekê yên ji neteweyên
din ve bûyîne, yên ji aliyê kesên
di bedenê de suneta bi dest ve ha-
tiye kirin û bi navê bisunetî tên
bîranîn, ên ji we re dibêjin bêsu-
net; 12 wê demê hûn, bê Mesîh,
di Îsraêlê de bê niştewarî û xerîbê
peymanên di derheqê wadê de û
li dinê bêhêvî û bê Xwedê bûn.
13 Lê belê demekê hûn yên dûr
mabûn, niha di Mesîh Îsa de, bi
saya xwîna Mesîh ve nêzîk bûn.
14 Ji ber ku yê her duyan dike yek û
dîwarê cihêkirinê xera dike û neya-
riyê, di sazûmanan de zagona emi-
ran, di bedena xwe de betal dike,
xweşiya[1] me ew e; 15 da ku, bila bi
aşitî kirinê di xwe de ji her duyan
mirovekî nû biafirîne 16 û neyariyê
wekî bi xaçê ve kuştibe, bi wê nav-
ditiyê her duyan di bedenekê de bi
Xwedê re li hev bîne 17 û ew hat û
him ji we re, yên ku li dûra ne re û
him jî ji yên nêzîk re mizgîniya
dilxweşiyê da; 18 ji ber ku di Ru-
hekî de ketina me her duyan ya hi-
zûra Bavo bi navgîniya wî ye.
19 Li gor vêya hûn êdî ne xerîb û
mêvan in, lê belê bi pîrozan re hem-
gel û maliyên[2] Xwedê ne. 20 Hûn
li ser bingeha ji şagirtan û peyxam-
beran ve, ya ku Mesîh Îsa bi xwe

1 Aştî.
2 Gelên mala.

kevirê quncikê ye hatin ava kirin.
21 Hemû xanî, bona ku di Xudan
de bibe peretsgehekî pîroz, di wî de
dizexme û bilind dibe; 22 hûn jî tevî
hev di Ruh de, bona ku bibin xaniyê
Xwedê, di wî de tên ava kirin[1].

*Raza ku ji Pawlos re tê eşkerekirin*
Ef 1,9-10; Kol 1,24-29; Rom 16,25-26;
1.Pêt 1,10-12

3 Ji ber vê yekê ez, Pawlosê ku
di oxra we netewan de girtiyê
Mesîh Îsa, 2 di derbarê wezîfeya
xêra Xwedê ya ku bona we ji min
re hatiye dayîn de, wekî ku berê
hinekî ji we re nivîsandibûm,
3 ger hûn ya ku raz li gor pey-
xamê têgihandiye min bihîstibin,
4 dema hûn bixwînin, hûn dikarin
bi vêya, di raza Mesih de fêhm-
kariya min fêhm bikin; 5 mîna ku
niha bi Ruh ve ji şagirtên wî yên
pîroz û ji peyxamberên wî re hati-
ye kişif kirin; 6 raza ku neteweyan
bi navgîniya yên mêrasker[2] in û
endamên pevra yên bedenê û În-
cîlê ve, di Mesîh Îsa de şirîkê wê
ne, di nifşeyên din de ji zarokên
mirov re nehat daxuyanî kirin.
7 Li gor diyariya xêra Xwedê ya li
gor çalakiya qudreta wî ji min re
hatiye dayîn, ez bûm xizmetkarê
Mizgîniyê. 8 Bona dewlemendi-
ya Mesîh ya ku nayê kişif kirin ji
netewan re mizgînî kirinê 9 û rêka
rêza ku ji destpêkê ve[3], di Xwedayê
ku her tiştî afirandiye de veşartiye
nîşanî hemû mirovan bide, ev xêr,
ji min, ji yê ku herî bêrumetê hemû
pîrozan e re hate dayîn; 10 da ku,
bila zaniyariya Xwedê ya pirralî
niha li gor teqdîra bêpêşî ya ku di
Xudanê me Mesîh Îsa de kiriye,
11 bi navgîniya Dêrê li cîhên ez-
manî ji hikumraniyan re û qudretan
re bê têgihandin; 12 bi navgîniya
baweriya ku ji wî re ye, bi ewleka-
riyê di wî de dilawêriya me û têke-
tina me heye. 13 Bo vêya ez rica
dikim ku, hûn li berya keserên ku
ez di oxra we de dikişînim newêrek
nebin; ew bilindahiya we ne.

*Ji bo zanîna hezkirina Mesîh dua kirin*
Kol 2,1-3; 2,9-10; 2.Pêt 3,18

14 Bo vê sedemê, ez li berya Bavê
ku hemû malbatên li ezman û li rûyê
erdê navê xwe ji wî stendine çong
dişkînim, 15 da ku, li gor dewle-
mendiya mezintiya xwe di zilamê
ji dil de, bi navgîniya Ruhê xwe bi
qudretê xwurtbûnê, 16 bi navgîni-
ya baweriyê rûniştina Mesîh ya di
dilê we de rûnê bide we; 17 da ku,
bona hûn bi hemû tijîbûna Xwedê
ve tijî bibin, wekî di hezkirinê de
bireh û bi bingehbûnê ve; 18 bi
hemû pîrozan re, di vêya de, fêhm

1 Lê kirin.
2 Mîratxur.
3 Ji mêj ve, ji berê ve.

kirina berfirehî, dirêjî û bilindî û
kûranî, ka çî ye 19 û bi zanîna ku,
hezkirina Mesîh ya ji zanînê ve gel-
lekî seretatir e hûn şiyandar bibin.
20 Bila li gor qudreta ku di me de
çalak e, ji yê ku dikare ji xwesteka
me an jî ji ya ku em fikirîne hê jî
zêdetir bike re, 21 di Dêrê[1] de û di
Mesîh Îsa de heta hemûya nifşan, ji
abadînê abadînan[2] ve mezinahî be!
Amîn.

*Yekîtiya Ruh*
Kol 3,12-14

4 Niha bo vê sedemê ez, yê di
Xudan de girtiye, ji we bona li
gor banga ku we girtiye bijîn rica
dikim; 2 bi hemû dilnizmî û xûner-
miyê ve, bi tehemûl, di hezkirinê
de ji hev û din re bisebir bin; 3 xîret
bikin ku hûn yekîtiya Ruh bi rêya
dilxweşiyê ve biparêzin. 4 Mîna ku
hûn bi hêviyek ji bang kirina we ve
hatine bang kirin, beden yek û Ruh
yek; 5 Xudan yek, bawerî yek,
vaftîz yek, 6 Bav û Xwedayê li ser
hemûyan û yê bi her tiştî û yê di we
hemûyan de ye, yek e.

*Xelatên Ruhanî û geşkirina bedena Mesîh*
Kol 2,1-7; 1.Kor 12,4-28; Rom 12,4-8

7 Lê belê xêr, ji me her yekî re, bi
pîvana Mesîh ve hat bexşandin.
8 Bona vêya dibêje:

Derket bilindahiyan û bindestan li
pey xwe birin û xelatan da miro-
van[3].

9 Niha ev gotina derket, ger ne
gotina ew pêşiyê daket jêran, rûyê
erdê nîn be, dê çi be? 10 Yê ku da-
ketiye jêr û bona her tiştî dagire[4], ji
hemû ezmanan ve gellekî derketi-
ye bilindahiyê eynî kes e. 11 Ew bi
xwe bona hin kesan bibe şagirt, hin
kesan bibe peyxamber, hin kesan
belavkirê Mizgîniyê û hin kesan jî
bona bibe serok û mamoste tayîn
kir; 12 da ku, bila pîrozan bona
wezîfeya xizmetê bikin û bona
geş kirina[5] bedena Mesîh bên xe-
milandin; 13 heta ku em hemû di
baweriyê de û di naskirina Lawê
Xwedê de bigihêjin yekîtiyê, raye-
dariyê û em ê di tijîbûna Mesîh de
bigihêjin mirovê[6] kamiliyê; 14 da
ku, êdî bi xapînokbûna mirovan,
bi hunera wanî ava kirina dafikên
xapandinê ve, em nebin zarokên bi
bayê her hînkirê ve li vira û li wira
diherikin; 15 lê belê em di hezki-
rinê de bi rasteqînî bikin û di hemû
tiştan de berbi wî ve mezin bibin,
ku, serî ew e, Mesîh e. 16 Di sero-
kantiya wî de hemû beden, bi alî-
kariya her movikê ve bi kelandin
û bi zexmbûnê ve bi şuxula birêza
her endamê xwe ve mezin dibe û
di hezkirinê de pêş ve diçe.

---

1 Civaka bawerkiran.
2 Heta bêdawiyê, ji abadînên abadînan.
3 Zebûr 68:18
4 Tijî bike.
5 Pêş ve birina.
6 Dereca.

*Jiyana nû û ya kevnare*
Kol 3,1-13; Gal 5,16-25

17 Niha, ez vêya dibêjim û di Xu-
dan de şahdeyiyê dikim; êdî mîna
jiyana neteweyên din, li gor ra-
manên vala ve nejîn; 18 hişê wan
kor bûye; ji berya nezaniya hun-
dirê wan û bêhêsbûna dilê wan ve
ji jiyana Xwedê re biyan mane.
19 Wan bi winda kirina hemû hêsên
xwe, bona bi çavbirçîtî ve hemû pî-
sitiyan bikin xwe dane kêfdariyê.
20 Lê belê hûn bi vî awayî hînî
Mesîh nebûn. 21 Ger, mîna ku rastî
di Îsa de ye we wê bihîstibin û di
wî de hûn hatibin fêr kirin; 22 li gor
vêya afirandina kevnare ya bi az-
weriyên xapînokî aidê jiyana we yî
berê ve xera bûye ji ser xwe bavêjin
23 û bi ruhê fikirandina xwe ve nû
bibin 24 û di duristiya rastî û pîro-
ziyê de mirovê nû yê li gor Xwedê
hatiye afirandin li xwe bikin.

*Seretayê jiyana nû*
Kol 3,8; 1.Kor 5,6-8

25 Bona vêya derewê berdin; bila
her yekî we bi cîranê xwe ve rastiyê
biaxife; ji ber ku em endamê hev û
din in. 26 Hêrs bibin û gunehan me-
kin; bila roj ji ser hêrsa we ve neçe
ava! 27 Fersendê nedin Îblîs jî!
28 Yê diziyê kiriye, bila êdî dizi-
yê meke; lê belê hîn zêde bila bi
destê xwe yê qenc bike û bixebi-
te; bi vî awayî bila tiştekî wî hebe
ku bi yê motaj re par bike.
29 Bila qet gotina xerab ji devê we
dernekeve; lê belê bona kesê ku
bibîhzin jê qencîtiyê bigirin, li gor
hewcê tiştên ku yên kesên din pêş
ve bibe bibêjin. 30 Rûhê Pîroz yê
Xwedê bi keserê ve mexin! Bona
roja xelasiyê, hûn bi wî ve hatin
mor kirin! 31 Bila bi her nêta xerab
re, hêrsa bi her avayî, gir û xeyidan-
din, qêrîn, xeberdan û îftira dûrî we
bibe! 32 Ji hev û din re[1] dilxweş û
bişewqat bibin û mîna ku Xwedê
we di Mesîh de bexşandiye, hûn jî
hev û din bibexşînin.

*Xerabiyê û qenciyê ji hev cuda bikin*
Kol 3,5-7; 1.Sel 4,1-8; 1.Kor 6,9-11;
1.Pêt 1,14-19; 2,9-12

5 Niha mîna zarokên xoşewîst,
Xwedê mînak bigirin 2 û çawa
ku Mesîh ji me hez kirîbe û xwe
bona me bi pêşkêşiyek bêhnxweş
û qurbanbûnek pêşkêşî Xwedê
kiribe, hûn jî bi vî awayî di rêya
evînê de bimeşin.
3 Lê belê bila tu carî di nava we de
zîna û tu qirêjî an jî çavbirçîtî bi
bîr ve jî neyê; ev ne li gor pîrozan
e. 4 Bila di nava we de bêterbi-
yetî[2] û axaftinê bi ehmeqî, an jî
qerfên erzan[3], yên ku ne liyaq in[4],

1 Bi hev û din re.
2 Bêedeb, kanc.
3 Adî.
4 Ev ne li gor we ne.

nîn be; lê belê hîn zêde şikir bikin.
5 Divê hûn bi biryarî bi vêya biza-
nibin ku, mêrasa tu kesê fahş, an jî
yê mindar, an jî yê çavbirçî ku tê
mana pûtperestiyê[1] di Serweriya
Mesîh û Xwedê de nîne. 6 Bila tu
kes we bi gotinên vala ve nexapî-
ne! Ji ber ku xezeba Xwedê ji ber
vana tê ser lawên bêîtaetker. 7 Bo
vê sedemê nebin şirîkê[2] wan!
8 Ji ber ku demekê hûn tarî bûn, lê
belê niha, hûn di Xudan de ronahî
ne. Bi zarokbûna ronahiyê ve bi-
jîn! 9 Ji ber ku mêwa ronahiyê di
her tewr qencî, duristî û rastiyê de
ye. 10 Bona hînbûna ka çi Xudan
xoşnûd bike, bişuxulin 11 û nebin
hevparên karên tariyê yên bêmêw;
lê belê hîn zêde wan eşkere bikin;
12 ji ber ku qala tiştên ji aliyê
wan ve dizîka dibin jî şerm e.
13 Lê belê her tiştê ku eşkere dibe,
ji aliyê ronahiyê ve xuya dibe; ji
ber ku her tiştê xuya dibe ronahî
ye. 14 Bo vê yekê dibêje:
Hişyar be, ya kesê di xewê de ye!
Ji mirinê ve biveje!
Dê Mesîh te ronahî bike!
15 Wê demê ka hûn çawa dijîn,
gellek balkêş bin; ne mîna kesên
ku bê zaniyarî ne, lê belê mîna
kesên zaniyar bijîn; 16 fersendê
bikirin[3]; ji ber, rojên ku em tê de
dijîn xerab in. 17 Bo vê yekê bêa-
qil nebin, lê belê ka xwestina Xu-
dan çî ye lê hîn bibin!
18 Û bi xemrê ve serxweş nebin, di
wê de kancitî[4] heye; lê belê bi Ruh
ve tijî bibin; 19 ji hev û din re Ze-
bûran, qesîdeyan û murxên ruhanî
bibêjin û di dilê xwe de ji Xudan
re murxan û Zebûran bixwînin;
20 bêsekin, bo her tiştî bi navê Xu-
danê me Îsa Mesîh ji Bavo Xweda
re şikir bikin; 21 di tirsa Xwedê
de[5] bengî hev û din bibin[6]!

*Têkiliya jin û mêr*

Kol 3,18-19; 1.Pêt 3,1-7

22 Ya pîrekno; mîna ku hûn ben-
gî Xudan dibin; bengî mêrên xwe
bibin. 23 Ji ber ku çawa xelaskerê
bedenê Mesîh serokê Dêrê ye, mêr
jî serokê pîrekê ye. 24 Lê belê mîna
ku Dêr[7] bengî Mesîh bûye, bila
pîrek jî bi vî awayî di her rewşê de
bengî zilamên xwe bibin.
25 Ya zilamno, Mesîh çawa ku ji
Dêrê hez kir û di oxra wê de xwe
feda kir, hûn jî ûsa ji pîrekên xwe
hez bikin; 26 bona wê bi şuştina
avê û bi paqij kirina gotinê ve
pîroz deyne, xwe feda kir; 27 ûsa
ku, Dêrê bila li ser wê leke, qer-
miçandin, an jî bêyî tiştekî mîna
vana bi rewşekî rewnaqî bi pîro-

1 Senem.
2 Hevpar, pardar.
3 Fersendê bînin cîh, an jî: Helsengandin bikin.
4 Bêedeb, bêterbiye.
5 An jî: Di tirsa Mesîh de.
6 Ji hev û din re histu xwar bikin.
7 Civaka bawerkiran.

zî û bêqisûrî pêşkêşî xwe bike.
28 Mîna vêya, zilam jî deyndar
in ku mîna bedena xwe ji pîrekên
xwe hez bikin. Kî ku ji jina xwe
hez bike, ji xwe hez dike; 29 ji ber
ku qet kesî, tu carî ji bedena xwe
ve nekiribiye; lê wê xwedî dike û
dihêvişîne, eynî mîna ku Mesîh
Dêrê xwedî dike û dihêvişîne.
30 Ji ber ku em, endamên bedena
wî, ji goştê wî û ji hestiyê wî ne.
31 Bona vêya dê zilam dayik û bavê
xwe berde û xwe bi pîreka xwe ve
girê bide û dê her du bibin bede-
nek[1]. 32 Ev rêz[2] mezin e; lê belê
ez vêya di derheqê Mesîh û Dêrê
de dibêjim. 33 Tevî vêya, bila her
yekî ji we jî, bi vî awayî mîna xwe
ji pîreka xwe hez bike û bila pîrek
hurmetê ji zilamê xwe re bike!

*Xwestina Xwedê ji bo zarok û dê û bav*

Kol 3,20-21; 5.Mûs 5,16; 6,6-7; Zeb 78,5-7

6 Ya zarokno, di Xudan de ji
dayik û bavên xwe re îtaet
bikin; ji ber ku ev rast e. 2 Hur-
metê ji bav û dayika xwe re bike,
(emrê yekemîn yê bi wadê re ye,
ev e); 3 da ku: Bila ji te re bibe
qencî û tu li dinê temen dirêj
bibe[3]! 4 Û ya bavikno, hêrsa za-
royên xwe hişyar mekin; lê belê
wan bi perwerde û şîreta Xudan
ve mezin bikin.

5 Ya dîlno, gotinên efendiyên
xwe yî li gor bedenê, mîna guh-
dana gotina Mesîh bi birêzî û tirsê
ve, bi dilê paqij ve guhdarî bikin.
6 Lê vêya mîna kesên ku bona
dilxweş kirina mirovan dixwa-
zin, bona bi çavan re xweşik xuya
bike, mekin. Lê belê mîna qûlên
Mesîh, xwestina Xwedê ji can ve
bînin cîh. 7 Û ne mîna ji mirovan
re, mîna ji Xudan re xizmet dikin,
ji dil ve xizmetê bikin 8 û dixwa-
ze bila kole, dixwaze bila azad
bibe, hûn dizanin ku dê her kes
bersiva her qenciya xwe ji Xudan
ve bistînin.
9 Û ya efendîno, hûn jî mîna vêya
bi dîlên xwe re eynî tiştî bikin û
tehdîtê li wan nekin[4]; hûn dizanin
ku Xudanê we û wan li ezman e
û ew di nava mirovan de cihêtiyê
nake.

*Têkoşîna Ruhanî*

1.Pêt 5,8-9; Rom 13,12; 1.Sel 5,8

10 Welhasil, di Xudan de û di
quweta qudreta wî de bihêz bibin.
11 Bona ku hûn bikaribin li dijî hî-
leyên Îblîs bisekinin, hemû çekên
Xwedê hilgirin[5]. 12 Ji ber ku şerê
me ne li dijî xwînê û goşt e, lê li
dijî rêvebiriyan, li dijî serweriyan,
li dijî hêzên vê dinya tarî, li dijî
artêşên xerabiyê yên ruhî, yên li

1 An jî: Yek beden (1.Mûsa 2:24).
2 Sir
3 (2.Mûsa 20:12; 5.Mûsa 5:16)
4 Wan metirsînin.
5 Xwe girê bidin.

cîhên ezmanî ne. 13 Ji ber vêya,
bona berxwedana roja xerab û
bona ku li pey çêkirina her tiştên
hewce li cîhê xwe bisekinin, hemû
çekên Xwedê hilgirin.
14 Bi vî awayî, wekî ku pişta xwe
bi rasteqîniyê şidandî û zirxê da-
diyê li xwe kiribe 15 û bi amade-
kariya[1] Mizgîniya xweşiyê wekî li
lingên xwe pêkiribin, li cîhê xwe
bisekinin. 16 Tevî vana hemû-
yan, mertala xwe yî baweriyê ya
hemû tîrên şerkar[2] bi agir ditefîne
jî rahêlin destê xwe. 17 Û mîx-
fera xelasiyê û gotina Xwedê ya
ku şûrê Ruh e, hilgirin; 18 bi dua
û li ber gerîna bi her awayî, her
tim di Ruh de dua bikin û ji bo vê
yekê, bi bergerandina bona hemû
pîrozan, bi bexşandinek bêkêmasî
hişyar bimînin. 19 Û bona ku ez
raza Mizgîniya[3] ku di oxra wê de,
di zincîrê de niwêneriyê[4] dikim; bi
dilawêrî daxuyanî bikim[5], bila di
vebûna devê min de gotin ji min
re bête bexşandin; 20 da ku, mîna
ji min re hewce dike, ez bona go-
tinê di wê de bi cesaret bim, ji bo
min jî dua bikin!

*Silavên dawîn*

Kol 4,7-9

21 Lê belê bona ku hûn bizanibin
ez çawa me, çi dikim, dê birayên
me yî bi rêz û xizmetkarê Xudan
yê ewle Tîhîkûs her tiştî agahî we
bike[6]. 22 A vay, min wî bona vî
tiştî ji we re şand; da ku, hûn tiştê
di derheqê me de ne bizanibin û
ew xemrewîniyê li dilê we bike.
23 Bila ji Bavo Xwedê û Xudan
Îsa Mesîh ve ji birayan re bi xweşî,
bawerî û hezkirin be. 24 Bila xêr[7]
bi hemû kesên ku ji Xudanê me
Îsa Mesîh bi hezkirinek bêdawî[8]
ve hez dikin re be! Amîn.

---

1 Bo belav kirina, an jî: Şahdeyiya Mizgîniyê.
2 Îblîs.
3 Încîl.
4 Şandî, qasid.
5 Bigehînim, bidim nasîn, an jî: Bibêjim.
6 Ji we re bighîne.
7 Qencî, kerem, an jî:Lutif.
8 Payîdar, mayînde, bêmirin, an jî: Baqî.

# NAMEYA PAWLOS YA JI FÎLÎPIYAN RE

BAWERIYA KU KÊFXWEŞIYÊ DIDE

*Pêşgotin*

Yê vê nameyê bi peyxama Xwedê ve nivîsandiye, Nûçevan Pawlos e. Dîroka nivîsandina vê nameya, rastî salên 60-64'an tê û li Romayê hatiye nivîsandin.

Civaka bawerkirên yê li bajarê Fîlîpiyê li herêma Makêdonyayê ye, di bin rewşekî dijwar de, di gera Pawlos ya duwemîn de hate ava kirin (K.Şa. 16:11-40). Taybetiya mirovên civakê ya pêşîn hezkirin û comerdî bû (4:15,16; 2.Kor. 8:2).

Pawlosê ku nameyê nivîsandiye, li Romayê, di girtîgehê de ye. Di vê navberê de sipasiyên xwe ji Fîlîpiyan re dişîne. Ji ber ku wan xelatekî ji wî re şandine. Babeta nameyê ya bingehîn; Xelasker Îsa Mesîhê ku bona mirovan xwe nizm kiriye yî (1:11,18,20,21; 2:5-11; 3:7-14,20, 21; 4:7,13,19,23).

Nûçevan Pawlos, Civakê (Dêrê), li dijî hînkirinên xapînokî ve îkaz dike (3:4-9,18,19). Li vir tê xuya kirin ku zanîn û bawerkirina Mesîh, armanca bingehîn e (3:10-14).

Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Pêşgotin 1:1-11
2. Rewşa Nûçevan Pawlos 1:12-26
3. Jiyana bawerkirê Mesîh û parvekariya wî 1:27-2:18
4. Di bawerkirina Mesîh de têkiliyên mirovan 2:19-3:21
5. Bi cesaret kirin û silav 4:1-23

*Destpêk û silav*

1 Ji qûlên Mesîh Îsa, ji Pawlos û
ji Tîmotêyos ve, ji çavnêrîvan
û wezîfedaran û ji hemû pîrozên
di Mesîh Îsa de, yên ji Fîlîpiyê ne
re: 2 Bila ji Bavê me Xwedê û ji
Xudan Îsa Mesîh ve xêr û xweşî
ji we re be!

*Spasî û dua Pawlos*

Kol 1,3-11

3 Her ku ez we di bîra xwe de tî-
nim, her tim di her duayê xwe de ez
bona we hemûyan bi kêfxweşiyê
dua dikim, 4 bi baweriya yê ku di
we de dest bi karê qenc kiriye, heta
roja Mesîh Îsa dê wê biqedîne[1],
5 ji roja yekemîn heta niha ji bo

beşdariya we yî bona pêşveçûna[1]
Mizgîniyê, ji Xwedayê xwe re
şikir dikim; 6 herweha di derbarê
we hemûyan de fikrandina vêya
bo min rast e, ji ber ku hûn di dilê
min de ne 7 û di qeydên[2] min de û
di parastin û belêyandina Mizgîni-
yê de hûn gişt bi min re di xêrê de
pardar in.
8 Ji ber, Xwedê şahdeyê min e ku,
min bi hezkirina di dilê Mesîh Îsa
de çawa bêriya we hemûyan kiri-
ye. 9 Û ji bo vêya dua dikim ku,
bila hezkirina we, di zanîn û di
haybûna bi her awayî de bêsekin
zêde bibe. 10 Ûsa ku, bila hûn za-
nibin qîmetên sereta cihê bikin û
bi vî awayî, 11 bona bilindî û pes-
nahiya Xwedê, bi mêwa rastiyê
ya ku bi navgîniya Îsa Mesîh ve
hatiye tijî bibin û heta roja Mesîh
pak û bêqisûr bibin.

*Belavbûna Mizgîniyê*

2.Kor 5,1-9; 2.Sel 2,8-10

12 Birano, ez dixwazim ku hûn
vêya bizanibin; tiştên ku hati-
ne serê min, herî zêde li qenci-
ya belavbûna Mizgîniyê bûye;
13 wusa ku, hemû nobedarê qesrê
jî tev de, her kes hîn bû ku min
di oxra Mesîh de li zincîran xis-
tine 14 û gellekên birayan jî, ji
ber zincîrkirina min, bi Xudan
ve ewle dibin û di gotina kelama
Xwedê de hîn jî dilawêr dikin.
15 Bi rastî hin kes Mesîh bi çav-
nebarî û pêşbaziyê, hin kes jî bi
nêta qenc ve waz didin; 16 vana
dizanin ku ez bona belav kirina
Mizgîniyê hatime wezîfedar ki-
rin û vêya bi hezkirinê çê dikin;
17 lê belê yên din jî Mesîh ne bi
dilê paqij, dibêjin qey dê di girtîbû-
na min de tengasiyê ji min re der-
xînin, bi azweriyên ezperestiyê ve
didin nasîn. 18 Ma çi be? Dixwaze
bila bi nêta xerab, dixwaze bila ji
rastiyê be, di her rewşê de Mesîh
tê danasînê; ez bi vêya kêfxweş
dibim û ez dê kêfxweş bibim jî.
19 Lewma dizanim ku, bi duayên
we û bi alîkariya Ruhê Îsa Mesîh,
dê vêya ji bona xelasiya min be;
20 li gora bende mayîna min, ya
tîndar û hêviya min, ez ê di tu
tiştî de neyêm şermezar kirin, lê
belê mîna ku her tim dibe, niha
jî, divê bi jiyanê, divê bi mi-
rinê be, dê Mesîh di bedena min
de, bi dilawêriyek bitûmî bête
bilind kirin.
21 Ji ber ku jiyan bona min Mesîh
e, mirin jî qezenc e. 22 Lê belê di
bedenê de jiyîn jî, ger ev, di karê
min de dê berê bîne, wê gavê ni-
zanim ez ê çi hilbijêrim. 23 Lê
belê ez ji her duyan aciz[3] dibim;

[1] Belav kirina, mizgin kirina, waz dana Îcilê.
[2] Zincir, pêwendi.
[3] Teng.

ez dixwazim ku cuda bibim û
tevî Mesîh bimînim; ji ber ku ev
hîn jî zêde qenc e; 24 lê belê di
bedenê de mayîna min, bona we
hîn jî hewce ye. 25 Û ez ji vêya
ewledar im û ez dizanim ku, ez
ê bimînim û bona ku hûn di ba-
weriyê de geş û dilxweş bibin, ez
ê li cem we hemûyan bimînim;
26 da ku, dema ez dîsa bêm cem
we, hûn di Mesîh Îsa de hîn jî bi
min pesnahiya xwe vedin.

*Îkazên ji bo pêdandî mayînê*

1.Sel 2,11-16; 2.Sel 1,4-12; K.Şa 14,22

27 Lê bila jiyana we liyaqî Miz-
gîniya Mesîh be, da ku, ez bêm
û we bibînim jî û ez neyêm jî,
tiştên di derheqê we de, di ru-
hekê de pêdandî sekina we, bona
baweriya Mizgîniyê, mîna can-
ekî bi hev re xebata we û di tu
tiştî de ji yê ku li dijî disekinin
ve netirsîna we ez bibihîzim;
28 ev, ji wan re helaq; lê belê ji
we re nîşana xelasiyê ye; ew jî ji
Xwedê ye. 29 Ji ber ku di oxra
Mesîh de tenê cihêtiya bi wî ve
bawerkirinê nedane we, 30 lê
belê bona hûn bibin xwediyê
xebata ku we di min de dîtine
û niha di min de dibihîzin û di
oxra wê de keserê kişandin jî ji
we re hate dayîn.

*Mesîh mînak bigirin*

Met 11,29; Rom 15,1-7; 2.Kor 8,9

2 Bi vî awayî ger di Mesîh de
cesaretek, ger xemrevîniyek ji
hezkirinê ve tê û di Ruh de yekîtî
hebe, ger hezkirinek û dilovani-
yek ji dil hebe, 2 kêfxweşiya min
temam bikin; da ku, bila eynî hez-
kirina we hebe û hûn wekî dilekî
bin û di fikirandina yek fikirî de
bin. 3 Tu tiştî bi ezîtiyê û bi pes-
nahiya vala ve mekin; lê belê bi
dilnizmiyê ve, bila her yek yê din
ji xwe sereta bihesibîne; 4 bila her
yekî ji we ne li karên xwe, lê belê
bila her yekî ji we li karên yê din
jî binihêre.
5 Ramana di Mesîh Îsa de bû, bila
di we de jî hebe; 6 ew Mesîhê ku,
çawa di haweya[1] Xwedê de bû jî,
lê bi Xwedê re wekheviyê mîna
xenîmetekê nehesiband; 7 lê belê
ji bilindahiya xwe tazî bû û hawe
ya qûla girt û di mînakbûna mi-
rovan de bû[2]; 8 û di awayiyê[3] de
wekî mirov hate dîtin û heta mi-
rinê, belê heta mirina xaçê îtaet
kir û xwe nizm kir. 9 Bo vê yekê
Xwedê wî gellekî bilind kir û
navê ku seretatirê her navî ye jê
re bexşand; 10 da ku, di navê Îsa
de[4] bila hemûyên li ezman in û li
erdê ne û di bin erdê de ne, çong
bişkînin 11 û bona bilindahiya

1 Sûret, hêsin.
2 Hate dinê.
3 Mînakbûnê, qidûmê.
4 An jî: Dema navê Îsa tê axaftin, tê bîranîn.

Bavo Xwedê, her ziman bi go-
tina, Îsa Mesîh Xudan e, mukir
werin[1].

*Îkazên ji bo jiyanek pîroz*

2.Pêt 1,5-11; 1.Pêt 2,9

12 Ji ber vê yekê, ya xoşewîstên
min, mîna ku we her demî îtaet
kirine, ne tenê dema ez di nava
we de bim, lê belê niha di tu-
nebûna min de hîn jî zêde bi tirs
û lerizîn, bona xelasiya xwe bixe-
bitin[2]. 13 Ji ber, yê bona tiştên ku
wî xoşnûd bike hûn him bixwazin
û him jî bikin di we de çalak e,
Xwedê ye. 14 Her tiştî bê gotin û
bê keftûleftê çêkin; 15 da ku, bila
hûn bi gotina jiyanê ve bi şidandî
pêçayî û li cem van nifşeyên xwar
û ji rê derketî de, di nava wan de
mîna stêrkên di kaînatê de bibi-
riqin, pak û bêqisûr, bibin zaroyên
Xwedê, yên bêleke; 16 da ku, ez
jî bibînim ku li cîhê vala baz ne-
dame û li cîhê vala keda xwe ne-
dame û di roja Mesîh de bibim
xwediyê sedema pesnvedanê.
17 Lê belê ger ez li ser pêşkêşiya
baweriya we û xizmeta wê ve mîna
qurbanekî rijandinê bêm qurban-
kirin jî, ez kêfxweş dibim û bi
we hemûyan re kêfxweş dibim[3];
18 mîna vêya hûn jî kêfxweş bi-
bin û bi min re kêfxweş bibin!

*Tîmotêyos û Êpafrodît*

1.Sel 3,1-11; 1.Kor 16,15-18

19 Lê belê ez di Xudan Îsa de hêvî
dikim ku di nêzîk de Tîmotêyos
ji we re bişînim; da ku, ger ez jî
tiştên di derheqê we de hîn bibim,
dilê xwe aram bikim. 20 Ji ber ku
kesekî minî din, mîna wî bifikire û
ji dil bi rewşa we re têkiliyê dey-
ne tune. 21 Ji ber ku hemû tiştên
xwe difikirin, ne tiştên Mesîh Îsa!
22 Lê belê bi dilsoziya wî ya ku
hatiye ceribandin û mîna ku law
xizmetê ji bav re bike, wî bi min
re, bona pêş ve birina Mizgîni-
yê xizmetê kiriye, hûn dizanin.
23 Her çi rewşa min eşkere bibe
nebe, ez hêvî dikim ku ez ê wî ji
we re bişînim. 24 Lê belê bi Xwe-
dê ve baweriya min ew e ku, ez bi
xwe jî di nêzîk de werim.
25 Lê belê min hewce dît, şagirtê
ku we bona dema teng de alîkari-
yê ji min re bike şandibû, birayê
min, kedkarê min û yê ku me pev
re têkoşînê dida Êpafrodît vegerî-
nim, ji we re bişînim. 26 Ji ber
ku bêriya we hemûyan dikir û ji
ber ku we nexweşiya wî bihîs-
tiye, zehf xemgîn bû. 27 Bi rastî
jî ew di dereca mirinê de nexweş
ketibû; lê Xwedê ji wî re, ne tenê
ji wî re, lê belê bona ez êşê bi ser
êşê ve nebînim ji min re jî dilova-

---

1 Mukir bên.

2 Di xelasiya xwe de serfiraz bên.

3 Ger xwîna min mîna xemra qurbanê birije jî ez kêfxweş dibim û beşdarî kêfxweşiya we hemûyan dibim.

niyê kir. 28 Niha bona ku hûn bi
dîsa dîtina wî ve kêfxweş bibin û
xemgîniya min jî kêm bibe, min
wî hîn jî zû şand. 29 Niha wî di
Xudan de bi hemû kêfxweşiyê
ve bêkêmasî qebûl bikin û kesên
mîna wî birûmet bikin. 30 Ji ber
ku bona alîkariya ku we nikarîbûn
ji min re bikirana, bike, canê xwe
avêt talûkê û di oxra karê Mesîh
de nêzîkî mirinê bû[1].

*Mesîh ji bo Pawlos her tişt e*
Gal 5,1-6; 2,15-21

3 Welhasil birayên min, di Xu-
dan de kêfxweş bin! Ji we re
nivîsandina tiştên wekhev, acizi-
yê nade min; lê belê ewlekariyê
dide we.
2 Xwe ji kûçikan ve biparêzin, ji
karkerên xerab ve xwe biparêzin;
ji jêkirinê[2] ve xwe biparêzin! 3 Ji
ber ku bisunetiyên rastî em, yên
bi navgîniya Ruhê Xwedê ve pe-
ristinê dikin, bi Mesîh Îsa ve pes-
nahiyê didin û bi bedenê ve ne ba-
wer in. 4 Bi rastî ez dikarîbûm bi
bedenê jî ewle bibûma; ger kesek
din dibêje qey ew bi bedenê ewle
bibe, ez hîn jî zêde; 5 ez ku, roja
heyştemîn hatime sunetkirin, ji
nîjada Îsraêl, ji eşîra Benyamîn,
ji Îbraniyan Îbraniyek; li gora za-
gonê Fêrisî, 6 li gora xîretê, yê ku
zilmê li Dêrê[3] dikir; li gor rastiya
ku di zagonê de ye, bêqisûr bûm.
7 Lê belê min her tiştên ku ji min
re dibe qezenc, di oxra Mesîh
de zerar[4] hesiband. 8 Belê, ji ber
bilindahiya zanîna Xudanê min
Îsa Mesîh, yê ku min di oxra wî
de her tiştên xwe winda kiriye,
bi rastî jî her tiştî zirar dihesibî-
nim û gihûr dihesibînim; da ku,
ez Mesîh qezenc bikim 9 û ne
rastiya min, ya ku ji zagonê ye,
lê belê bi baweriya Mesîh ve, bi
rêya baweriya ji Xwedê ve û wekî
rastî û baweriya min hebe, ez di
wî de bêm dîtin; 10 ez bi girtina
sûretê mirina wî, wî û bi qudreta
vejîna wî û bi şirîkantiya keserên
wî bizanibim; 11 da ku, bi rêyekê
ji miriyan bigihêjim vejînê.
12 Ez nabêjim ku ji niha ve
gîhaştime vana, an jî ji niha ve
gîhaştime wê rayedariyê; lê belê
bona xelata ku Mesîh bi qezenc
kirina min ve daniye qezenc bikim
baz didim. 13 Birano, ez hîn xwe,
vana qezenc kirî nahesibînim;
lê belê vêya dikim: Hemû tiştên
li dawiyê maye ji bîr dikim û bi
dirêjbûna hemû tiştên pêşiyê ve
14 bona qezenc kirina xelata ku
Xwedê di banga xwe yî ezmanî
de ya di Mesîh Îsa de daniye ber
bi armancê ve baz didim. 15 Li

1 An jî: Hindik ma bû ku bimirana.
2 Kurtayiyê; hînbunek sexte binêr: Gal 1, 6-7; 5, 1-12 û 2.Kor 11.
3 Civaka bawerkiran.
4 Xesar, ziyan.

gora vêya bila hemû gîhaştiyên
me[1] di vê ramanê de bin û ger
di babetekî din de, ramanekî we
yî din hebe, dê Xwedê vêya jî bi
eşkeretî xuyayî we bike. 16 Lê
tiştê ku em gihîştinê çi be, em bi
eynî zagonê ve bimeşin[2]!

*Îkazên li dijî neyarên xaça Mesîh*

Rom 16,17-18; Gal 6,7-8; Îbr 13,14; Kol 3,1-4

17 Birano, hûn hemû bi hev re min
mînak bigirin û di jiyana kesên ku
li gora mînakên me dijîn de balkêş
bin. 18 Ji ber ku, mîna min bi caran
di derheqê wan de ji we re gotiye,
niha jî di nava hêsirên çavan de
dîsa dibêjim; gellek kesên dimeşin
hene ku, neyarên xaça Mesîh in[3].
19 Dawiya vana têkçûn e; îlahê
vana hûrê wan e û bi şermên xwe
pesnên xwe vedidin, tenê vê dinê
difikirin. 20 Lê belê welatê me
li ezmana ye; em ji wir li benda
Xelasker; Xudan Îsa Mesîh in jî.
21 Ew, bi çalakiya hêza xwe yî di-
kare her tiştî bi xwe ve girêde, dê
bedenên me yî ketî jî biguherîne û
bike mîna bedena xwe yî bilind.

*Yek bin, kêfxweş û di aştiyê de bin*

1.Sel 5,14-19

4 Ji ber vê yekê, ya xoşewîstno,
kêfxweşiya min, taca serê min,
birayên minî xoşewîst, yên min ji
dil bêriya wan kiriye, bi vî awayî
di Xudan de ûsa sabît[4] bisekinin!
2 Ez ji Evodiya ve rica dikim û
Sîntîhê ve rica dikim, bila di Xu-
dan de di ramanekî de bin. 3 Belê,
ya rêhevalê minî rasteqîn; li ber
te jî digerim, alîkariyê ji wan re
bike; ji ber ku ew bi min re, bi
Klêment re û bi kedkarê min ên
din yên navê wan di pirtûka ji-
yanê de ne re, bona Mizgîniyê
têkoşînê kirin.
4 Di Xudan de her tim kêfxweş bin;
dîsa dibêjim: Kêfxweş bin! 5 Bila
sernermiya we ji aliyê hemû mi-
rovan ve bê zanîn. Xudan nêz e[5]!
6 Di tu tiştî de xemê nekişînin; lê
belê bila di her tiştî de xwestekên
we, ji Xwedê re, bi dua û lava-
yan, bi şikiryê ve bête gîhandin
7 û dilxweşiya Xwedê ya ku hemû
hînkirinan derbas dibe, dê di Mesîh
Îsa de[6] dilên we û ramanên we bi-
parêze!
8 Welhasil, ya birano, çi rûmetên
rastî, birêzî, rasteqînî, pak, xweşik
û dilovanî hebe, çi rûmetên liyaqî
pesnahiyê û bixûpakî hebe, wê bi-
fikirin! 9 Yê ku hûn hîn bûne, we
qebûl kirine, bihîstine û her çi tiştê
ku we di min de dîtine jî bikin û dê
Xwedayê dilxweşiyê bi we re be.

1 Kamilên me.

2 An jî: Hew em jiyanek li gor merteba ku em gihaştine wê, bajon!

3 An jî: Bi neyariya xaça Mesîh ve dijîn.

4 Pêdandî.

5 An jî: Hatina Xudan nêz e.

6 An jî: Bi navgîniya Îsa Mesîh ve.

*Spasiya Pawlos*
Îbr 13,3.5.16

10 Niha, ji ber ku we fikirê xwe yî
di derheqê min de ne, di dawiyê
de nû kirine, ez di Xudan de zehf
kêfxweş bûm û we di vê babetê
de jî difikirîn, lê belê fersenda
we tunebû. 11 Gotina min ne di
derheqê hewcedariyê de ye; ji ber
ku ez di her rewşa ku tê de me,
hînî qinyatkariyê bûme. 12 Ez
bi xizanî kişandinê jî dizanim, di
nav firehiyê de jînê jî. Di her tiştî
û di hemû tiştan de ez hînî raza
him têrbûnê, him birçîbûnê, him
di firehiyê de bûnê, him jî di mo-
tajiyê de bûnê[1], bûm. 13 Ez dika-
rim bi navgîniya yê ku min bi hêz
dike, her tiştî bikim. 14 Lê belê
we qenc kir ku tengasiyê min, bi
min re par kirin.
15 Û ya Fîlîpiyan, hûn jî dizanin
ku, di destpêka Mizgîniyê de,
dema ez ji Makêdonyayê derke-
tim, di babeta dayîn û stendinê de
xeynî we tenê, qet tu Dêr beşdarî
min nebû. 16 Ji ber ku dema ez
li Selanîkê bûm jî, li ser motaji-
ya min we yek du cara ji min re
şandin. 17 Ji ber ku ez li diyariyê
nagerim; lê belê li hilbera li gor
hesabê we zêde bûye ve digerim.
18 Lê belê her tiştê min heye û
ez di firehiyê[2] de me; tiştên ku ji
we hatine ji Êpafrodît ve stendim
û tijî me; vana pêşkêşiyên bêhn
xweş, qurbanên meqbûl yê ku bi
Xwedê ve xweş xuyanî dibin e.
19 Û Xwedayê min her hewceyên
we, dê bi dewlemendbûna xwe,
di Mesîh Îsa de bi rewnaqiyê ve
bibîne. 20 Bila ji Bavê me Xwe-
dê re, heta bi abadîna abadînan ve
bilindahî be! Amîn.

*Silavên dawîn*

21 Ji her yê pîroz re di Mesîh Îsa
de silavê bikin! Birayên li cem
min in, silavê li we dikin. 22 Hemû
pîrozan û bi taybetî yên maliyên
Qeyser in, silavê li we dikin.
23 Bila xêra[3] Xudanê me Îsa
Mesîh bi we hemûyan re be[4]!
Amîn.

---

1 Mayînê.
2 Zêdehî xenîtî.
3 Qencî, kerem, an jî: Lutif.
4 An jî: Bi ruhê we re be.

# NAMEYA PAWLOS YA JI KOLOSIYAN RE

## SEROKÊ CIVAKA BAWERKIRAN

*Pêşgotin*

Yê vê nameyê bi peyxama Xwedê ve nivîsandiye, Nûçevan Pawlos e. Dîroka nivîsandina vê nameya ku ji Romayê ve hatiye nivîsandin salên 60-64 in. Xirbên li rojavaya Denîzliyê, li nêzîkî Honozê ye, bajarê Kolosê bû. Pawlos, bona hînkariya Xwedê hînî bawerkirên li Kolosê, li Lawdîkya û li Hîêrapolîsê (Pamûkkale) û bona wan bi metirsî bike vê nameya nivîsand (4:13,15,17).

Gellek hînkariyên xerabkir di navendê de peyda bûbûn. Armanca vana, xerabkirina aliyê Mesîh ê Xwedanî û bilind û xerakirina jiyana pîroz ya bawerkiran bû (2:8,16,19). Armanca vana, girêdayiya bi Xwedê ve têxin şiklekî, wergerîna felsefê bû. Xelaskirina ku Mesîh kesan xelas dike û nûkirina wî yî jiyanê, bêfêdeyiya van pêşniyaran eşkere dike (2:4-15).

Di nameyên Efesiyan û Kolosiyan de hinek wekhevî hene, lê belê babeta bingeh cihê ne. Di nameya Efesiyan de Civaka bawerkiran (Dêr), bedena zindî ya Mesîh, di nameya Kolosiyan de jî Mesîh bi serokê Civakê ve tê danasîn. Mirov dikare babetên nameyê bi vî awayî rêz bike:

1. Silav û sipasî 1:1-8
2. Dua 1:9-14
3. Bêdawî û bêserîbûna Mesîh 1:15-23
4. Xizmeta Pawlosê Nûçevan 1:24-2:3
5. Bersiva ji hînkariyên xerabkir ve tê dayîn 2:4-15
6. Jiyana bi tendurustî û peristin 2:16-3:4
7. Sereteyên jiyana bi tenduristî 3:5-17
8. Têkiliyên maliyan 3:18-4:1
9. Sazûmana jiyanê û dua 4:2-6
10. Nûçeyên şexsî 4:7-18

*Destpêk û silav*

1 Ji Pawlosê ku bi viyana[1] Xwe-
dê bûye şagirtê Mesîh Îsa û ji
birayê Tîmotêyos, 2 ji birayên di
Mesîh de pîroz û dilsoz, yên ku
li Kolosê ne re: Bila ji Bavê me
Xwedê û Xudan Îsa Mesîh ve, ji
we re xêr û xweşî bibe!

*Dua û lavayên Pawlos ji bo Dêrê*
Fîl 1,3-6; 1.Sel 1,2-4

3 Di Mesîh Îsa de baweriya we û
di kelama rasteqîn ya Mizgîniya
ku ji we re hatiye de, bi sedema
hêviya ku we di derheqê wê de ji
berê ve bihîstine, bona we li ez-
manan veşartî ye; 4 wekî me ji
hezkirina we ya bi hemû pîrozan
re ye bihîstine bin, her tim bona
we bi dua kirinê, 5 em ji Xwedê
û Bavê Xudanê me Îsa Mesîh re
şikir dikin. 6 Ew Mizgînî mîna ji
roja ku we wê bihîst û bi rastî jî
hînî xêra Xwedê bûn di nava we
de ye, di hemû dinê de jî mêwan
dide û mezin dibe. 7 We vêya ji
xizmetkarê Mesîh, yê dilsoz, yê
ji bo we ye, ji hemkedkarê me
yî xoşewîst Êpafras ve bihîstin;
8 wî jî hezkirina we yî di Ruh de
têgîhand me.
9 Ji ber vê yekê, ji roja ku me vêya
bihîstiye, em jî bona we ji dua û
lava kirinê, bi hemû zanyarî û fêhm
kirina ruhanî ve ji xwestina bona ku
hûn xwestina wî bêkêmasî bizani-
bin paş ve nesekinîn; 10 da ku, hûn
bi liyaqiya Xudan ve bijîn û wî ji her
alî ve xoşnûd bikin, bona ku hûn di
her karê qenc de hilberê[2] bidin û di
nasîna Xwedê de pêş ve biçin, em
dua dikin. 11 Em dixwazin bona ku
hûn li berya her tiştî bi kêfxweşiyê
baldirêjî bin, xwe bispêrin hêza wî
û bi qudretê ve xwurt bin; 12 hûn
ji Bavo yê ku me bona şirîkantiya
mêrasa pîrozan ya di ronahiyê de
ye ehîl daniye re şikiryê bikin.
13 Wî, me ji hukimraniya tariyê
ve xelas kir û danî serweriya Lawê
xwe yî xoşewîst. 14 Em di xwîna
wî de xwediyê xelasiyê û efû kirina
gunehên xwe ne.

*Bilindahiya Îsa Mesîh û xaça wî*
Îbr 1,1-4; 1Kor 15,20-28

15 Ew xuyakirina Xwedayê ku
xuya nabe, pêşî zayiyê hemû
afirandinê ye. 16 Ji ber ku li erd û
ezman, hemû tiştên xuya dibin û
yên xuya nabin, textan, serweriyan,
rêvebiriyan û hukimraniyan, her
tişt di wî de hate afirandin; hemû
tişt bi navgîniya wî û bona wî
hatine afirandin. 17 Yê berî her
tiştî heye ew e û her tişt hebûna
xwe di wî de didomînin. 18 Û
serê bedênê, yanê, serê Dêrê[3]

1 Daxwaz, îrade.
2 Mêwe.
3 Civaka bawerkiran.

ew e; bona ku di her tiştî de cîhê
pêşîn bigire, yê destpêk û di nava
miriyan de pêşiyê bûyiye ew e.
19 Ji ber ku (Xwedê) li cîh dît ku
bila hemû tijîbûna xwe di wî de
be 20 û razî hat ku bi xwîna xaça
wî[1] ve, bi ava kirina aşitiyê divê
tiştên ku li erdê ne, divê tiştên ku
li ezman in, bi navgîniya wî ve
hemû bi xwe re[2] li hev bên.
21 Û hûn jî, demekê di fikrandi-
na xwe û di karên xwe yî xerab
de biyan û neyar bûn, 22 lê belê
niha di bedena xwe yî goşt de, bi
navgîniya mirinê ve wî hûn li hev
anîn; 23 ger hûn ji hêviya Mizgî-
niya ku ez, Pawlos xizmetkarê wê
me, ya ku we bihîstine û ji hemû
afirên di bin ezmanan de ne re tête
waz kirin, tev nelibitin; di bawe-
riyê de bi bingehîbûnê û pêdan-
dî bidomînin, dê we bi pîrozî û
bêleke û bi bêsûcî di hizûra wî de
pêşkêş bike.

*Xizmeta Pawlos ya bona bawerkiran*
Ef 3,1-13; 1.Kor 2,7-13

24 Ez niha ji bona we keser
kişandina xwe ve kêfxweş dibim û
kêmasiya tengasiyên di oxra Dêra
ku bedena Mesîh e de, ji aliyê min
ve di bedena xwe de temam di-
kim. 25 Ez, bona kelama Xwedê,
raz a ku ji dewr û nifşan ve hati-
ye veşartin, li gor rêzkirina bona
we, ya Xwedê, ya ji min re hatiye
dayîn, bûm xizmetkarê Dêrê; 26 lê
belê raz, ji pîrozên wî re niha hate
daxuyanî kirin; di nav netewe-
yan de dewlemendiya bilindahiya
vê razê ka çî ye, 27 yanê, Xwedê
xwest bigehîne wan ku, Mesîhê ku
hêviya bilindahiyê ye, di we de ye;
28 vêya jî em, bona ku her mirovî
di Mesîh de bi kamilbûnê pêşkêş
bikin, ji her mirovî re bi şîret û ji
her mirovî re bi hemû hîkmeta wê
hînkirinê ve bang dikin; 29 bo vê
yekê ez jî li gor kirinên wî yên bi
qudretê ve dike, bi cehd û xebatê
ve têkoşînê didim.

2 Ji ber ez dixwazim hûn
bizanibin ku divê bo we, divê
bo yên li Laodîkyayê ne û divê jî
bo yên tu carî wecê min nedîtine, ez
çi têkoşînek mezin didim; 2 da ku,
bila dilê wan metirsiyê bibîne û bila
di hezkirinê de yek bibin; 3 yanê,
bila bigihêjin hemû dewlemendiya
ewledariya hînkirê daye û raza
Xwedê, Mesîhê ku hemû xezîneyên
zaniyarî û zanînê tê de veşartiye, nas
bikin. 4 Ez vêya, bona tu kes we bi
gotinên nerm ve nexapînin dibêjim.
5 Ji ber ku her çiqas ez bi bedenê ne
di nav we de bim jî, bi ruhî tevî we
me; ez birêzbûniya we û zexmbûna

[1] An jî: Bi navgîniya xwîna wî ya ji xaçê ve hatiye herikandin.

[2] Bi Xwedê re li hev bên.

baweriya we yî bo Mesîh dibînim û
kêfxweş dibim.

*Îkazên li dijî hînkariyên çewt û jiyana di Mesîh de*

Rom 16,17-18; Ef 4,14-15; 1.Tîm 6,20-21

6 Wê demê we çawa Xudan Mesîh
Îsa qebûl kiribin, bi wî awayî di
wî de bijîn 7 û bi şikiryê ve tijî
bibin, di wî de bi reh bibin û bi
avahîbûnê mîna ku hînî we bûye
di baweriyê de bi hêz bibin.

*Tijîbûna Xwedê û xelasiya di Mesîh de*

Îbr 1,1-4; Ef 1,18-2,7

8 Xwe biparêzin! Bila tu kes bi go-
tinên vala û xapînokî, bi felsefeya
xwe yî ne li Mesîh, li kevneşopa
mirovan û seretayên bingehê dinê
ve spartî ye we talan nekin; 9 ji
ber ku hemû tijîbûna Xwedayî bi
bedenî di wî de ye; 10 serê her
rêvebir û serweriyê ew e û hûn jî
di wî de gîhaştin tijîbûnê.
11 We di suneta Mesîh de, bi ji
xwe kirina bedena goşt[1], bi sune-
ta ku bi dest ve nayê çêkirin hûn
di wî de hatin sunet kirin. 12 Di
vaftîzê de hûn bi wî re hatin binax
kirin û bi baweriya anîna hêza Xwe-
dayê ku wî ji mirinê ve vejandiye,
hûn jî bi wî re vejiyan. 13 Dema
hûn ji berya sûc û bêsunetbûna
bedena xwe mirî bûn, wî hemû
sûcên we bexşandin, we tevî wî
vejandin. 14 Wî zagona nivîsî ya
ku bi qaîdeyên xwe li dijberê me
bû, paqij kir, wê li xaçê xist û ji
navendê rakir. 15 Dema wî çekên
di destê serwerî û rêvebiriyan de
girt, wan di xaçê de bindest kir û
bi vî awayî her tiştî bi eşkeretî li
ber çavan raxist.

*Li pêy hînkariyên çewt ve mekevin*

Gal 4,1-11.19; Rom 7,1-6; 1.Tîm 4,1-8

16 Bo vê sedemê bila tu kes di
derheqê xwarin û vexwarin, cejn,
an meha nû, an jî roja Sebtê de we
daraz neke; 17 vana, siya tiştên
ku dê were ne, lê belê ya esil di
Mesîh de ye[2]. 18 Bila tu kesên
di dilnizmiya sexte û peristina
milyaketan de di ber xwe didin,
yên li ser xewnên xwe yî dîtiye
disekine û bi ramanên ezitiya
xweza ve li cîhê vala quretiyê
dikin û yên nikarin xwe bi Serî ve
bigirin, we bêyî xelata we nehêlin.
19 Bi alîkariya hemû beden, movik
û peywendiyan ji vî Seriyî xwe têr
dike û temam dibe, bi mezinbûna
ku Xwedê dide geş dibe.
20 Ger hûn tevî Mesîh, ji sere-
tayên bingehî yên dinê re mirine,
ma çima hûn mîna yên di dinê
de dijîn, li pey qaîdeyên mîna:
21 Vêya negre, vêya tam neke û
dest vêya nede, diçin? 22 Hemûya
vana, bona tiştên bi şuxulandinê

---

1 An jî: Ezitiya biguneh.

2 Beden ya Mesîh e.

ve tune bibin e; spartî emir û hîn-
kariyên mirovan e. 23 Bê şik, ji
aliyê ji dil ve peristinê, dilnizmiya
sexte û ji bedenê re eziyet kirinê
de, xuyakirinek zaniyarî ya van
qaîdeyan heye; lê belê bona ber-
ketina têkçûna ezitiya xweza, tu
qenciya wan nîne.

*Jiyana nû ya di Mesîh de*

Kol 2,20; Ef 2,4-6

3 Niha, ger hûn tevî Mesîh veji-
yabin, tiştên li ezmanê ne bi-
gerin; Mesîh li wir, li rastê Xwedê
rûniştiye. 2 Ne li tiştên erdê ne,
tiştên ku li ezmanê ne bifikirin.
3 Ji ber ku hûn mirin, jiyana we
tevî Mesîh, di Xwedê de veşartî
ye. 4 Mesîhê ku bûye jiyana me,
kengî xuyanî bibe, wê çaxê hûn ê
jî bi wî re, di bilindahiyê de bêne
xuyanî kirin.

*Îkazên bona ji hev hezkirinê û jiyanek pîroz*

Ef 5,3-8; 4,17-31; 2.Kor 5,17

5 Bo vê sedemê endamên xwe
yî li ser rûyê erdê: Zînayê, pîsitî,
azwerî, xwestekên xerab û çav-
birçîtiya tê mana pûtperestiyê,
bikujin! 6 Ji ber vana, xezeba
Xwedê, bi ser lawên bêîtaetê ve
tê. 7 Dema ku hûn di nava vana
de dijiyan, hûn jî demekê di wan
de dimeşiyan. 8 Lê belê niha, hûn
jî: Hêrsê, girrê, xerabiyê, îftirayê,
ji devê xwe ve gotinên bêede-
bî, giştikî bavêjin[1]. 9 Derewan ji
hev û din re mekin; ji ber ku we
afirandina kevin, tevî elimandinên
xwe yî xerab ji ser xwe derxist û
avêtin. 10 Û we afirandina nû, ya
li gor wekhevbûna Afirderê xwe
bona gîhaştina zanîna bêkêmasî
hatiye nû kirin, li xwe kirin; 11 di
wê de cihêtiya Grek û Cihûd, bi-
sunet û bêsunet, barbar[2], Îskît, dîl
û azadan nîne; lê Mesîh her tişt e
û di her tiştî de ye.

12 Bi vî awayî hûn, mîna yên
ji aliyê Xwedê ve bi pîroz û
xoşewîstiyê ve hatine bijartinê,
qenciyê, dilxweşiyê, dilnizmiyê,
sebr û nermiyê li xwe bikin;
13 bila têkiliyên we yî bi hev û
din re, dilxweş û nerm bibin; ger
giliyê yekî ji we, ji yê din hebe,
mîna ku Xudan we bexşandiye,
hûn jî hev û din wusa bibexşînin.
14 Li ser hemûyan vana ve hezkirina
ku peywendiya kemaliyê[3] ye li xwe
bikin. 15 Bila dilxweşiya Mesîh, di
dilê we de dadmend[4] bibe; ji vêya
re jî hûn di bedenekê de hatin dawet
kirin û bibin yên şikiryê dikin!
16 Bila gotina Mesîh, bi hemû
dewlemendbûna xwe di hundirê
we de bijî; bi hemû zaniyariyê

---

1 Berteref bikin.

2 Barbar, ji bo hemûyên ku ne Grek (Yewnan) bûn.

3 An jî: Şirîta gîhaştinê.

4 Ferwerde, an jî: Hakem.

hînî hev û din bikin, şîreta bidin
hev, bi gotina Zebûran, qesîdeyan
û murxên ruhanî di dilê xwe de bi
şikiryê awazan bilindî Xwedê bikin.
17 Û her çi ku hûn di gotinê de,
an jî di şixulê de bikin, hemûyan
bi navê Xudan Îsa û bi navgîniya
wî ji Bavo Xwedê re şikiryê bikin
û çêkin.

*Têkiliyên malbatî û civakî*

Ef 5,22-23; 6,1-9; 1.Pêt 3,1-7; 2,18-19;
Tît 2,9-10; 1.Tîm 6,1-2

18 Ya pîrekno, li gor di Xudan
de liyaq be, bengî zilamên xwe
bibin! 19 Ya zilamno, ji pîrekên
xwe hez bikin û li dijî wan mua-
meleya tehl mekin! 20 Ya zarok-
no, di her tiştî de ji dayik û bavên
xwe re îtaet bikin; ji ber ku ev,
Xudan xoşnûd dike! 21 Ya ba-
vikno, zarokên xwe neêşînin; ya
na dê metirsiya wan bişkê!
22 Ya dîlno, di her tiştî de ji efen-
diyên xwe yî li gor bedenê re îtaet
bikin; vêya ne mîna kesên ku
dixwazin mirovan xoşnûd bikin,
xizmeta li ber çavan xweş dibe
dikin, lê bi dilê pak û bi tirsa Xu-
dan bikin. 23 Bi zanîna hûn dê ji
Xudan ve xelata mêrasê bistînin,
24 her çi hûn bikin, ne mîna ku ji
bo mirovan dikin, mîna ku bona
Xudan dikin ji dil[1] çêkin; hûn ji
Xudan Mesîh re qûlitiyê dikin!
25 Lê belê yê ku neheqiyê dike, dê
bersiva neheqiya ku kiriye bistîne
û di nava mirovan de cihêtî nîne.

4 Ya efendîno; bizanibin ku li
ezman Efendiyek we jî heye û
bi vî awayî ji dîlê xwe re bidad û
wekheviyê ve têkiliyê deynin.

*Dua û şikir bikin*

Ef 6,18-20; 5,15-17

2 Xwe bidin duayê û di wê de
hişyar bimînin û şikir bikin. 3 Di
eynî demê de bona me jî dua bikin,
da ku, bila Xwedê, bona gotina wî
belav bikin û bona raz a[2] Mesîhê
ku ez di oxra wî de hatime meh-
kûm kirin daxuyanî bikin, bila de-
riyek ji me re veke 4 û bona ez vê
razê li gor ku hewceye bi eşkeretî
belav bikim.
5 Fersendê bistînin[3] û li dijî yên
ku li derve ne, bi zaniyariyê ve
bimeşin. 6 Bona hûn bizanibin
ku ji her kesî re ka dê bi çi awayî
bersiv bête dayîn, bila gotina we,
mîna bi xwê ve hatibe perwerde
kirin, her tim bi xêrê be.

*Silavên dawîn*

Ef 6,21-22

7 Birayê me yî birêz, Tîhîkûsê di
rêya Xudan de hemkedkarê min

---

1 An jî: Ji can.
2 Sir.
3 An jî: Fersendê hêja bikin.

û xizmetkarê ewledar, dê hemû
tiştê di derheqê min de bigehîne
we. 8 A vay, bi vê armancê bona
ku rewşa me bigehîne û metirsiyê
bide dilê we, min wî ji we re, 9 tevî
yekî ji we, birayê ewledar û birêz
Onîsîmûs şand; ew dê hemû tiştên
li vir dibin, bigihînin we.
10 Hevalê minî girtîgehê Arîstar-
kûs û biraziyê Barnabas Marqos, –
we emiran di derheqê wî de girtin;
ger were cem we, wî qebûl bikin
– 11 û Yêşûyê ku jê re Yûstûs tête
gotin, ji we re silav dikin; vana yên
ji bisunetbûnê ve ne; bona Serwe-
riya Xwedê tenê vana hevalên min
yên xebatê ne û ew ji min re bûn
xemrevînî. 12 Yekî ji we û yê ku
qûlê Mesîh Îsa ye, Êpafras silavê
li we dike; bona ku hûn bi xwesti-
na Xwedê ve girêdayî bimînin û
rayedar û xwedîbûna ewledariyek
bê kêmasî li ser pêlan bimînin,
ew her tim ji bo we bi duayê ve
ceng dike. 13 Ji ber ku ez di der-
heqê wî de şahdeyiyê dikim ku,
him bona we û him jî bona yên li
Lawdîkyayê û Hêrapolîsê ne, pirr
ked daye. 14 Hekîmê[1] birêz Lûqa
û Dîmas silavê li we dikin.
15 Ji birayên li Lawdîkyayê ne re,
ji Nîmfa re û ji Dêra ku li mala wî
ye re silavê bikin. 16 Û paşî ku vê
nameya di nava we de hate xwen-
din, wusa bikin ku, bila di Dêra
Lawdîkyayê de jî bê xwendin û
hûn jî nameya ku ji Lawdîkyayê ye,
bixwînin. 17 Û ji Axrîpo re: Bona
xizmeta ku te di Xudan de girtiye
bibe serî, balkêşê wê be! bibêjin.
18 Ez, Pawlos, vê silavê bi destê
xwe ve dinivîsînim. Girêdana min
di bîra xwe de bînin[2]! Bila xêr[3] bi
we re be! Amîn.

1 Doktor, bijîjk.
2 Bînin bîra xwe, an jî: Ji bîr mekin!
3 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA YEKEMÎN JI SELANÎKIYAN RE

DÎSA HATINA MESÎH

*Pêşgotin*

Pawlos, di gera xwe yî duwemîn ya belavkirina Mizgîniyê de, serîkî da bajarê Selanîkê ya navenda Makêdonyayê ye. Dema belavkirina Mizgîniya Xwedê, ji ber ku êrîşekî giran avêtin ser wî, hewcedar ma ku ji bajêr ve cuda bibe (K.Şa. 17:1-10). Di vê navberê de li Selanîkê jî civakek ava bûbû. Ev mirovana hîn di destpêkê de, li rêvebirekî digeriyan. Pawlosê ji ber vê rewşê gellekî xemgîn bûbû, dema li Atînayê bû, Tîmotêyos ji wan re şand (1.Sel. 3:1,2; K.Şa. 17:15,16). Dema Tîmotêyos rêwîtiya xwe qedand û vegeriya Korîntê, nûçeyên xweşî di derheqê Civaka Selanîkiyan de anî (1.Sel. 3:6; K.Şa. 18:5). Bawerkirên li wir, heta êrîşên wir sist bibin, li hemberê wan li berxwe dabûn. Di dilsoziya Mesîh de xwurt bûbûn û bi Dêrekî zexm, dest bi Mizgîniya Kêfxweşiyê belavî mirovên din kiribûn. Lê hinek babet hebûn, dixwestin ku ji Pawlos ve hîn bibin. Bi taybetî jî lêkolînê li ser hatina Îsa ya duwemîn û di rewşa kesên ji çûna Pawlos de mirine dikirin. Pawlos, bi peyxamdana Xwedê ve, nameya yekemîn ji Korîntê ve bona Civaka bawerkiran nivîsand (K.Şa. 18:1).

*Destpêk û silav*

1 Pawlos û Sîlvanos û Tîmotêyos, ji Dêra Selanîkiyan, ya ku di Bavo Xwedê de û di Xudan Îsa Mesîh de ye re: Bila xêr û xweşî ji we re be[1]!

1 An jî: Bila xêr û xweşî ji we re be!

*Bawerî û jiyan*

Kol 1,3-8

2 Em di duayên xwe de we di bîr de tînin û her tim, bona we hemûyan şikiryê ji Xwedê re dikin. Em, çalakiya we yî dexla baweriyê, 3 keda we yî xwe spartiye hezkirinê û berxwedaniya

we yî ji hêviya ku we bi Xudanê
me Îsa Mesîh ve girê dayîne, li
ber Bavê xwe Xwedê her tim bi
bîr tînin. 4 Birayên minî Xwedê
ji wan hez dike, em dizanin ku
wî we bijartiye. 5 Ji ber Mizgî-
niya ku em belav dikin ji we re
ne tenê bi gotinan, bi qudretê ve,
bi Ruhê Pîroz ve û bi ewlebû-
nekî mezin ve gîhişt we. Ji ber
ku dema em di nava we de bûn,
bona qenciya we em çawa diji-
yan, hûn dizanin.
6 Û we di nava pirr tengasiyan
de bi dilxweşiya ku Ruhê Pîroz
daye, gotinê qebûl kir û bûn yên
ku li gor me û Xudan dikin[1];
7 ûsa ku, hûn ji hemû bawerkirên
li Makêdonya û li Ahayayê re bûn
mînak. 8 Ji ber ku gotina Xudan ji
we belav bû; xebera baweriya we
yî bi Xwedê ve tenê ne gîhaştiye
Makêdonya û Ahayayê, lê belê
gîhaştiye her derî; ûsa ku, êdî hew-
ce nema ku em tiştekî bibêjin. 9 Ji
ber ku ezimandina ku we ji me re
kiriye 10 û bona ku ji ezmanan li
benda Lawê xwe yî li nav miriyan
vejandiye, Îsayê ku dê me ji xeze-
ba were biparêze bimînin û bona
ji Xwedayê ku zindî û rasteqîn e
re qûlitiyê bikin, ew bi xwe aga-
hiyê didin ku ka hûn çawa ji pûtan
vegeriyane Xwedê.

*Xizmeta Pawlos ya li Selanîkê*

K.Şa 20,18-21; 20,31-35; 1.Kor 2,1-5;
2.Kor 4,1-2.5; 12,14-15

2 Ji ber, ya birano, hûn bi xwe
dizanin ku seredana me yî we
vala neçûye; 2 lê belê mîna ku
hûn dizanin, berê me li Fîlîpiyê
eziyet kişandibûn û heqaretê[2] li
me kiribûn jî, li gor bi dijwarî li
bersekiniya wan, bona ku Mizgî-
niya Xwedê ji we re bidin belav
kirin, me ji Xwedayê xwe metir-
siyê girtin. 3 Ji ber ku teşwîq kiri-
na me ne ji çewtiyan, ne ji minda-
riyê ye; ne jî bi fenekiyê ye; 4 lê
belê, ji ber ku ji aliyê Xwedê ve
em liyaqî emanet girtina Mizgî-
niyê hatine dîtin, em ne bona mi-
rovan, bona Xwedanê ku dilê me
diceribîne xoşnûd bikin diaxifin.
5 Ji ber, mîna ku hûn dizanin, em
tu carî bi gotinên xapînokî an jî bi
maskekî çavbirçîbûnê veşêre ve
nehatin; Xwedê şahde ye. 6 Em
ne li pey pesnvedanek ji mirovan
ve bê bûn, ne ji we, ne ji kesekên
din; bi şagirtbûna Mesîh, me di-
karibûn ji we re bibûna bar; 7 lê
belê mîna dayîkekî ku zaroyên
xwe dimijîne[3], têkiliyên me yî bi
we re bi dilovanî bû.
8 Em ûsa ji dil bi we ve hatibûn
girêdan ku, ne tenê Mizgîniya
Xwedê, em razî bûn ku heta canê

[1] Yên li me û Xudan hatine, an jî: Mînak girtine.
[2] Zilmê.
[3] Mîna dayikekî ku zaroyên xwe dide ser sînga xwe.

xwe jî bi we re par bikin; ji ber ku
me ewqasî ji we hez kir! 9 Ji ber
ku, ya birano, ked û zehmeta me
tê bîra we; bona ku ji we tu kesekî
re nebin bargiranî, bi şev û roj em
şuxulîn û me Mizgîniya Xwedê ji
we re waz da. 10 Hûn şahde ne
ku têkiliyên me yî yê bi we re, yê
bi bawerkiran re çiqasî pîroz, rast
û bêqisûr bû; Xwedê jî şahde ye.
11 Mîna ku hûn dizanin, têkiliyên
bavekî bi zaroyên wî re çawa be,
têkiliyên me yî bi her yekî ji we
re ûsa bû; 12 me dilawêriyê da
we, we xemrevîn kirin; me bona
hûn li gor Xwedayê ku we bangî
serwerî û bilindahiya xwe dike,
bijîn, teşwîq kirin.

*Berxwedana baweriya bawerkiran*

1.Sel 1,6-10; 2.Sel 1,4-5

13 Û ji bo vêya em jî bê sekin ji
Xwedê re şikir dikin ku, gava we
gotina Xwedê ji me bihîst û qe-
bûl kirin, we vêya ne mîna gotina
mirovan, lê belê di rastiyê de jî
we bi gotin bûna Xwedê wê qe-
bûl kir; ya ku di we bawerkiran
de çalak e jî ev e. 14 Ji ber ku,
ya birano, we Dêrên Xwedê[1] yên
li Cihûstanê ne û bi Mesîh Îsa ve
girêdayîne ji xwe re mînak gir-
tin; ji ber, mîna ku wan ji Cihû-
dan ve tengasiyan kişandine, we
jî tengasiyan ji hemnîjadên xwe
ve kişandin; 15 yên ku Xudan
Îsa û peyxamberan kuştine û me
qewirandin û Xwedê razî nakin û
dijberê hemû mirovan in; 16 bi vî
awayî, bê sekin, guneh li ser gu-
nehên xwe dicivînin; bona xelas
bûna wan nahêlin ku em ji nete-
wan re bibêjin. Lê belê xezeba
bêdawî[2] daket ser wan!

*Pawlos bêriya bawerkirên Selanîkê dike*

Rom 1,9-13

17 Lê belê em, ya birano, di de-
mekî kurt de, ne di dil de, lê di
bedenê de li dûrî we man; bi bêrî-
kirinek mezin, bona ku wecê we
dîsa bibînin me hîn zêde xîret kir;
18 ji ber ku me, dixwestin ku em
werin cem we û ez, Pawlos, min
çend cara xwest û Îblîs bû astengê
me. 19 Ji ber ku hêviya me, an
dilxweşiya me, an jî taca ku em bi
wê pesnên xwe vedin çî ye? Belê,
ma li ber Xudanê me Îsa Mesîh,
di hatina wî de ne hûn in? 20 Ji
ber ku pesnahiya me û dilxweşiya
me hûn in!

3 Ji bo vêya êdî me deyax ne-
kirin û em li Atînayê, bi tenê
hiştinê ve razî bûn 2 û bona ku we
pêdandî bike û di derheqê bawe-
riya we de xemrevîniyê bike, me

---

1 Civakên Xwedê.

2 Xezeba Xwedê daket ser wan, an jî: Rastî xezeba bêdawî hatin.

birayê xwe Tîmotêyos, yê ku di
Mizgîniya Mesîh de xizmetkarê
Xwedê ye, şand; 3 da ku, bila di
tengasiyan de tu kes nelerize, ji
ber, hûn bi xwe dizanin ku, em
bona vêya hatine wezîfedar kirin.
4 Ji ber ku me tengasî kişandina
xwe ji berê ve, hîn gava em li cem
we bûn ji we re gotibûn û mîna
ku hûn dizanin ûsa jî bû. 5 Bi vê
sedemê êdî min jî zêde nikarîbû
di berxwe bida û bona ez rewşa
baweriya we û ka xapînok rêyekî
wê dît û we xapand, gelo keda me
berhewa bû an nebû[1] hîn bibim,
min wî şand.
6 Lê belê Tîmotêyos yê ku hîn nû
ji cem we vegeriyaye cem me, di
derheqê bawerî û hezkirina we
de nûçeyên xweş anîn; her tim
bîranîna we yî qencî di derheqê
me de, qasî ku me bêrîkirina dîti-
na we kiriye, we jî ewqas bêriya
me kiriye got; 7 bi vê sedemê ya
birano, di nava hemû êş û ten-
gasiyên xwe de ji ber baweriya
we, me bi we xemrevîniyê dîtin.
8 Ji ber ku ger hûn bi Xudan ve
girêdayî bimînin, em ê bijîn!
9 Ji ber ku li berya Xwedanê xwe,
bi bersivbûna vê dilxweşiya ku
me bona we bihîstiye, gelo em
ê çawa bi têrî bona we şikiryê ji
Xwedanê xwe re bikin? 10 Bona
ku em bi we re rû bi rû hevdîtinê
bikin û kêmasiyên baweriya we
temam bikin, bi şev û roj em zehf
dua dikin.
11 Bavê me Xwedê bi xwe û Xu-
danê mẹ Îsa Mesîh, bona ku em
bigihêjin we, bila rêya me veke!
12 Û mîna ku hezkirina me ji we
re heye, bila Xudan we di hezki-
rina ji hev û din re û ya ji hemû
mirovan re de, mezin û zêde bike!
13 da ku, dema Xudanê me Îsa
Mesîh bi hemû pîrozên xwe re
hat, bona ku hûn li berya Bavê me
Xwedê di pîroziyê de bêqisûr bin,
bila dilê we bizexmîne[2].

*Îkazên bona jiyanek pîroz*

1.Pêt 1,14-16; Ef 5,3-8; 1.Kor 6,13-20

4 Bi kurtî, ya birano, ka hûn ê
çawa bijîn û ka hûn ê çawa
Xwedê dilxweş bikin, hûn ji me
hîn bûn; çawa ku hûn ûsa dijîn;
bona ku hûn di vê babetê de hîn
jî pêş ve herin, em bi navê Xudan
Îsa rica ji we dikin û we teşwîq
dikin. 2 Ji ber ku hûn dizanin bi
rayedariya Xudan Îsa me kîjan
temmiyan gihandiye we.
3 Ji ber ku xwesteka Xwedê ev e:
Pîrozbûna we, ji zinê revîna we,
4 kirina her yekî ji we yî, ne mîna
neteweyên Xwedê nenas bi azwe-
riyên şehwetî, 5 her yekê ku ji nav
we di pîrozahî û birêziyê de, zanî-
na xwedî derketina bedena xwe û

[1] Keda me bi valahiyê çû an neçû.

[2] Zexm bike.

a vay, xedarî û êrîşê li birayê xwe
re nekirin e; 6 ji ber, mîna ku me
berê jî ji we re gotibûn û şahdeyî
kiribûn; Xudan di derheqê hemû
van tiştan de tolhildar e. 7 Ji ber ku
Xwedê ne bona em di bêexlaqiyê
de bijîn, lê belê bona di nava pîro-
ziyê de bijîn bangî me kir. 8 Niha
kesê ku vê banga red bike, ne mi-
rov, lê belê Xwedayê ku Ruhê xwe
yî Pîroz daye me red dike.

*Îkazên bona ji hev hezkirinê*

1.Pêt 1,22; 2.Sel 3,6-12

9 Lê belê di babeta hezkirina bira-
tiyê de, hewcedariya we nîne ku,
kes ji we re binivîsîne; ji ber ku
bona hezkirina ji hev û din, hûn bi
xwe ji aliyê Xwedê ve hatine hîn
kirin; 10 ji ber ku hûn vêya ji hemû
birayên li Makêdonyayê ne re di-
kin. Lê belê, ya birano, em ji we
rica dikin ku hûn di vê babetê de
hîn jî pêş ve biçin 11 û mîna ku me
li we temmi kirine, ajotina jiyanek
aram, nêrîna li karê xwe û şuxula bi
destên xwe ji xwe re bikin armanc;
12 da ku, hûn li hemberê yên ku li
derve ne, bi awayekî qenc bimeşin
û hewcedarî tiştekî nebin.

*Dîsa hatina Îsa û vejîna miriyan*

1.Kor 15,12-58; Fîl 3,20-21

13 Ya birano, bona ku hûn mîna
mirovên dinî di nava bêhêvîbûnê
de dijîn bi keser nebin, em na-
xwazin ku hûn di derheqê kesên
çavên xwe li jiyanê girtîne de
bêzanîn bimînin. 14 Ji ber ku, ger
em bawerî bi mirina Îsa û vejîna
wî ve bînin; bi vî awayî dê Xwedê
kesên di Îsa de, di xew de ne jî,
bi wî re bîne. 15 Ji ber ku li gor
gotina Xudan em vêya têdigihînin
we: Em, yên zindî[1], yên heta ha-
tina Xudan dê zindî bimînin, tu
carî nakevin berya kesên ku ça-
vên xwe ji jiyanê re girtine. 16 Ji
ber ku Xudan bi xwe, dê bi qêrî-
na emrekî, bi dengê sermilyaketê
û bi borîjena Xwedê ji ezman ve
dakeve û pêşiyê dê miriyên aidî
Mesîh bivejin. 17 Paşî wê em, yên
ku dijîn û (li jiyanê) hatine hiştin,
bi wan re, bona pêrgîniya Xudan
di nava ewran de dê me rahêlin
bibin û bi vî awayî, em ê her tim
bi Xudan re bin. 18 Bi vî awayî,
niha bi van gotinan xemrevîniyê
li hev û din bikin!

*Ranekevin, heşar û şiyar bin*

Met 24,36-51; Lûq 12,35-40; 21,34-36;
Rom 13,11-14

5 Lê belê, ya birano, hewceya
we nîne ku di derheqê dem û
wextan de ji we re bête nivîsin.
2 Ji ber, hûn baş dizanin ku, roja
Xudan şev çawa ku dizek tê, dê
wusa were. 3 Gava ew bibêjin:
Aşitî û ewlekarî, mîna ku jan bi
pîreka ducanî ve bikeve, dê hela-

---

[1] Yên dijîn.

qekek nişka ve ji wan re were û tu
carî dê nikaribin birevin. 4 Lê belê
hûn, ya birano, ne di tariyê de ne
ku, ew roja mîna dizekî we bigire;
5 ji ber ku hûn hemû lawên ronahi-
yê, lawên rojê ne. Em ne aidî şevê
an jî tariyê ne. 6 Wê çaxê, em mîna
kesên din ranekevin, heşar û şiyar
bin! 7 Ji ber ku yên radikevin, şevê
radikevin û yên serxweş dibin şevê
serxweş dibin. 8 Lê belê em, yên
aidê rojê ne, zirxa bawerî û hezki-
rinê û hêviya xelasiyê bi kumzirxi-
yê li xwe kin û heşar bimînin. 9 Ji
ber ku Xwedê, ne bona ku em bên
xezebê, lê belê bona ku bi navgîni-
ya Xudanê me Îsa Mesîh bigihêjin
xelasiyê me bijart; 10 ew bona me
mir; da ku, dixwaze hişyar, dixwa-
ze di xewê de bin, em bi wî re bijîn.
11 Bona wê, mîna ku hûn çêdikin,
hev û din bi metirsî bikin û hev û
din pêş ve bibin[1]!

*Silav û şîretên dawîn*

Îbr 13,20-21; 1.Kor 1,8-9

12 Lê belê, ya birano, em rica di-
kin ku qîmeta yên di nava we de
dixebitin û yên di rêya Xudan de
serokantiyê li we dikin û şîretan di-
din we bizanibin 13 û bona karên
ku dikin hezkirin û birêziyek me-
zin nîşanî wan bidin! Bi hev re di
nava aşitiyê de bijîn! 14 Lê belê,
ya birano, em li ber we digerin,
yên vala digerin îkaz bikin, yên
tirsonek dilawêr bikin, ji bêhêzan
re alîkar bibin, li berya her kesî bi
sebir bibin! 15 Bala xwe bidinê
ku bila tu kes, bersiva xerabiyê bi
xerabiyê ve nede; lê belê bona hev
û din û bona hemû mirovan, her
tim qenciyê bikin armanca xwe!
16 Her tim kêfxweş bibin! 17 Bê-
sekin dua bikin! 18 Di her rewşê
de şikir bikin; ji ber ku xwestina
Xwedê ya bona we di Mesîh Îsa de
ev e. 19 Ruh netefînin[2]! 20 Gotinên
peyxambertiyê biçûk nebînin!
21 Her tiştî biceribînin; bi zexmî bi
ya qenc ve bigirin! 22 Ji xerabiya
bi her tewrî birevin!

23 Lê belê ew bi xwe, Xwedayê
çavkaniya dilxweşiyê, bila we bi
tûmî pîroz bike û ruhê we, canê
we û bedena we, di hatina Xu-
danê me Îsa Mesîh de bêkêmasî
û bêqisûr bê parastin! 24 Yê ku
bangî we dike, ewledar e û ew dê
vêya çêbike.

25 Birano, bona me dua bikin!
26 Ji hemû birayan re bi ramûsana
pîroz ve silav bikin! 27 Ez li cem
Xudan we didim sond xwarinê
ku, bila ev name ji hemû birayên
pîroz re bête xwendin.

28 Bila xêra[3] Xudanê me Îsa
Mesîh bi we re be! Amîn.

---

1 An jî: Hev û din ava bikin.Venemirînin.
2 Venemirînin.
3 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA DUWEMÎN JI SELANÎKIYAN RE

## HÊVÎ Û XEMREVÎNIYA KU BI HATINA MESÎH VE TÊ DAYÎN

*Pêşgotin*

Paşê, ji ber ku Selanîkiyan dîsa zanînê xwestin, Pawlos nameya duwemîn nivîsand. Ev her du nameyên ku di salên 53-54'an de hatine nivîsandin, nameyên Pawlos, yên pêşîn in. Babeta her du nameyan jî dawiya demê ye. Di şewla vê bûyerê de, ya dikeve ser bawerkirên Mesîh, di pîrozahiya jiyanê de, di jîritiyê de û di têkiliyên qenc de dayîna îspata baweriyê ye.

*Destpêk û silav*

1 Pawlos û Sîlvanos û Tî-
motêyos, ji Dêra Selanîkiyan,
ya ku di Bavê me Xwedê de û di
Xudan Îsa Mesîh de ye re: 2 Bila
ji Bavê me Xwedê û Xudan Îsa
Mesîh ve xêr û xweşî bi we re be!

*Kêfxweşiya ku dê were û li dijî dijminên wî daraziya Xwedê*

Fîl 1,27-30; Met 5,10-12; Rom 8,17-18; 1.Pêt 4,12-13; Met 13,40-43; 25,31-46

3 Ya birano, em ji bo we, mîna ku
liyaq e, her tim deyndarê şikirya
Xwedê ne; wekî ûsa kirin jî li cîh
e; ji ber ku baweriya we zehf bizê-
deyî mezin dibe û hezkirina we yî
ji hev û din re zêde dibe; 4 wusa
ku, em bi xwe ji ber sebr û bawe-
riya we ya di hemû zilm û tengasi-
yên ku hûn dikişînin de, di Dêrên[1]
Xwedê de pesnên we didin.
5 Vana, nîşana daraziya Xwedê ya
bi dadî ye; da ku, hûn ê bona Ser-
weriya Xwedê, ya ku hûn di oxra
wê de êşan dikişînin, liyaq bêne
hesibandin. 6 Ji yên ku bi Xwedê
ve nizanin û ji yên ku ji Mizgîniya
Xudanê me Îsa Mesîh re îtaet na-
kin ve, bi tol hildanê, dema Xudan
Îsa, 7 bi milyaketên hêza xwe, di
pêta agir de ji ezman xuyanî bibe,
8 ji yên ku tengasî dayîne we re
bi tengasiyê û ji we re, ji yên ku
tengasî dikişînin re, bi me re, bi
rehetiyê ve dayîn, li cem Xwedê
rast e. 9 Di wê rojê de, dema di
pîrozên xwe de bê pîroz kirin û
di hemûyên ku bawerî anîne de
heyraniyê hişyar bike were, 10 ew
dê ji ber Xudan û ji ber meziniya
qudreta wî, cezaya helaqa abadîn

1 Civakên.

bikişînin; ji ber ku bi şahdeyiya
me ya ku ji we re hate kirin, ba-
werî hate anîn.
11 Ji ber vê yekê, bona ku Xwe-
dayê me we liyaqî bangê bibîne û
li gor xêra Xwedayê me û Xudan
Îsa Mesîh, bona navê Xudanê me
Îsa Mesîh di we de bilindtir bibe û
hûn di wî de bilind bibin; 12 bona
riza her qenciyê û karê baweriyê
bi qudretê ve bibe serî, em bona
we her tim dua dikin.

*Nîşanên berî hatina Mesîh*

1.Sel 4,13-5,10; 1.Yû 2,18-25; 4,1-6;
Dan 7; Pey 13 û 17

2 Niha ya birano, di derheqê hati-
na Xudanê me Îsa Mesîh û pev
re bi wî re civîna me de: 2 Divê bi
ruh, divê bi gotinê, divê wekî ji me
be bi nameyê, em ji we rica dikin,
wekî roja Xudan hema amade be[1],
di ramanê de şaş nebin û neleri-
zin. 3 Bila bi tu awayî, tu kes we
nexapîne! Ji ber, heta ku dawşêle[2]
neyê û lawê helaqê, zilamê fesadi-
yê 4 yê ku li dijî her tiştê ku jê re
Xwedê tête gotin, an jî her tiştê ku
jê re peristin tête kirin disekine û
di perestgeha Xwedê de rûdine û
xwe mîna Xwedê nîşan dide û xwe
bilindir dike, xuyanî nebe, ew roj
nayê. 5 Qey nayê bîra we, dema ez
hîn li cem we bûm, min vana ji we
re got? 6 Hûn dizanin ku niha çi
astengiyê li yê ku wexta wî bê, dê
derkeve qadê dike. 7 Ji ber ku, ji-
xwe raza fesad dişuxule, lê heta ku
ji holê ve bête rakirin, yê ku asteng
dibe heye. 8 Û zagonnenasê ku, dê
Xudan Îsa bi hilma devê xwe wî
bikuje û bi xuyabûna hatina xwe
wî betal bike, wê gavê xuya bibe
ku, 9 hatina wî, bi hemû qudretê û
elametan û bi nuwazeyên derewîn
ve û bona yên ku helaq dibin bi
hemû fenekiyên xwe ve li gor ki-
rina Îblîs e; 10 ji ber ku wan bona
xelasiya xwe hezkirina rastiyê qe-
bûl nekirin.
11 Û ji ber vê yekê, Xwedê bona
ku ew bi derewan ve bixapin, hê-
zek xapînokî bi ser wan de dişîne;
12 da ku, bila hemû kesên bi rasti-
yê bawer nebûne û ji xerabiyê ve
zewqê girtine bên daraz kirin.

*Xwedê we bona xelasiyê bijart*

Rom 8,29; 1.Pêt 5,10-11

13 Lê belê, ya birayên ku ji ali-
yê Xudan ve tên hez kirin, em
deyndar in ku her tim bona we
ji Xwedê re şikir bikin; ji ber ku
Xwedê bona ku hûn bi navgî-
niya Ruh ve bên pîroz kirin û bi
bawerkirina rastiyê ve xelas bi-
bin, ji destpêkê de we hilbijart;
14 bi navgîniya Mizgîniya me,
we bangî vêya kirin; da ku, hûn
bigihêjin bilindahiya Xudanê me

[1] Hatiye.

[2] Ji baweriyê vegerîn.

Îsa Mesîh. 15 Niha, ji ber vê yekê,
ya birano, pêdandî bisekinin û bi
hînkariya ku divê bi gotinê, divê
bi nameya me ve hûn hatine hîn-
kirin ve bigirin.
16 Û Xudanê me Îsa Mesîh bi
xwe û Bavê me Xwedayê ku ji me
hez kiriye û bi xêrê xemrevîniyek
abadîn û hêviyek zexm daye me,
17 bila ew dilê we xemrevîn bike
û we di her pişka qenc û gotinê de
zexm bike!

3 Bi kurtî, ya birano, bona ku
Gotina Xudan, mîna di nav
we de bû, bi lez belav bibe û bê
bilind kirin, bona me dua bikin;
2 bona ku em ji mirovên bêexlaq
û xerab xelas bibin jî dua bikin;
ji ber ku baweriya hemûyan nîne.
3 Lê belê Xudan ewledar e; ew
ê we zexm bike û ji yê xerab ve
xelas bike. 4 Di Xudan de hêviya
me bi we heye ku, hûn, tiştên
ku me emir kirine dikin û hûn ê
bikin. 5 Lê belê bila Xudan, dilê
we ber bi hezkirina Xwedê û
sebra Mesîh ve bibe.

*Bi keda xwe jiyana xwe bidomînin*

1.Sel 2,9-10; 4,1; 4,11-12

6 Niha, ya birano, em bi navê
Xudan Îsa Mesîh emir didin we
ku, ji her birayên ku ne li pey hîn-
kariyên ku ji me qebûl kirine, lê
bê nîzamiyê dimeşin ve dûr bise-
kinin[1]. 7 Ji ber, hûn bi xwe diza-
nin ku hûn ê çawa me ji xwe re
bi mînakî bigirin; ji ber ku dema
em di nava we de bûn, em ne yên
valagerok bûn 8 û me bê berdêl
nanê kesekî nexwarin; lê belê,
bona ku em ji we yekî re nebin
bargiranî, bi şev û roj em bi ked
û zehmetê ve xebitîn. 9 Ne ji ber
ku rayedariya me tunebû, lê belê
bona ku hûn li gor me bikin, em
xwe mîna mînakekê nîşanî we
bidin bû. 10 Ji ber ku dema hîn
em li cem we bûn, me vî emrî da
we: Yê ku naxwaze bixebite, bila
xwarinê jî nexwe! 11 Ji ber, em
dibihîzin ku hinek kes di nava
we de betal digerin; tu karî na-
kin, lê belê dipelişin karên kesên
din. 12 Û bona yên ku wusa ne,
bi aramiyê bixebitin û nanê xwe
bixwin, em di Xudan Îsa Mesîh
de temmî[2] û wan teşwîq dikin.
13 Lê belê, ya birano, hûn ji qen-
cîtî kirinê ve aciz nebin! 14 Lê
belê ger kesekî ji van gotinên
me yî di vê nameyê de ne re îtaet
neke, wî nîşan bikin[3]; bona ku ji
kirinên xwe ve bişerme, têkiliyên
xwe yî bi wî re bibirin. 15 Û dîsa
jî wî neyar nehesibînin, bi bi-
ratîbûnê wî îkaz bikin.

1 Lê li pey bê nizamiyê dimeşin ve dûr bisekinin.
2 Emir didin wan.
3 An jî: Mîmkirin.

*Daxwaz û silavên dawîn*

16 Lê belê Xudanê aşitiyê her wext, di her rewşê de, bi xwe aşitiyê bide we! Bila Xudan bi we hemûyan re be!

17 Ez Pawlos, bi destê xwe ve silav; di her nameyê de nişan ev e; wusa dinivîsînim.
18 Bila xêra[1] Xudanê me Îsa Mesîh bi we hemûyan re be! Amîn.

[1] Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA YEKEMÎN JI TÎMOTÊYOS RE

ŞÎRETÊN JI ŞÎRETKIRÊ CIWAN RE

*Pêşgotin*

Aliyên taybetî yê her du nameyên ji Tîmotêyos re û nameya ku ji Tîtûs re bi peyxamdana Xwedê ve hatine nivîsandin, hene. Em vê dema ku, kalepîriya Pawlos e, nizanin. K. Şagirtan qala dema berî Pawlos dike, lê qala paşî wî nake.

Dema Karên Şagirtan diqede, Pawlos li Romayê, di malekê (ku wî bi xwe kirê kiriye) de girtî ye (28:30,31). Ûsa tê texmîn kirin ku, du sal paşî vê demê dîsa hatiye berdan û derketiye gerên xwe. Bûyerên wê demê, babetên van nameyan e.

Mîna ji nameya yekemîn ya ku ji Tîmotêyos re hatiye nivîsandin jî tête fêhmkirin, Nûçevan Pawlos, berî demekê, serîkî daye herêma Efesê, dema bona biçe Makêdonyayê, wezîfeyan daye Tîmotêyos û wî li wir, li Efesê hiştiye (1:3). Babeta vê nameya, hewcedariya hunerê rêvebirên Civakê ye.

Nûçevan Pawlos, Mesih çawa wî xelaskiriye têdighîne, di derbarê girîngiya dua de daxuyanî dike. Ka dê rêvebirên civata Dêrê çawa bin, di nav civatê de rêvebiriya qenc dê çawa be têdighîne. Di derheqê bersîngkirina buhrana daringperestî ya di her dem û dewrê de mijûlayiyê dide bawermendan, şîret û pêşniyaran dide.

Mirov dikare vê nameya ku di nava salên 65-67 de hatiye nivîsandin bi vî awayî kurt bike:

1. Têkiliya Pawlos û Tîmotêyos 1:1-20
2. Serrastî û peristina di nava Civakê de 2:1-4:16
3. Serrastiya civandinê 5:1-25
4. Pirsgirêkên tewr bi tewr 6:1-21

*Destpêk û silav*

1 Pawlosê ku li gor emrê Xelaskerê
me Xwedê û Xudan Mesih Îsayê
ku hêviya me ye, şagirtê Îsa Mesîh e
2 ji yê ku di baweriyê de lawê minî
rasteqîn e, ji Tîmotêyos re: Bila ji
Bavo Xwedê û Xudanê me Mesih
Îsa ve xêr, dilovanî û xweşî be!

*Îkazên di derheqê hînkariyên çewt de*

1.Tîm 6,3-5; 6,20-21; Tît 3,9;
Gal 3,10-12; 3,19-24

3 Dema ez diçûm Makêdonyayê,
mîna ku min ji te rica kiribû[1], li
Efesê bimîne û temmiya belav
nekirina hin kesê bi hînkariyên
cihê bide. 4 Xeynî vê yekê, tu
emir bike ku bila girîngiyê nedin
çîrokan û darnîjadên dûr û kûr[2].
Vana, sazûmana Xwedê ya ku
bi navgîniya baweriyê çalakiya
xwe nîşan dide, ava nakin. Li dijî
wê, rêya guftego û galegalan ve-
dikin.
5 Lê belê armanca vê temmiyê,
hişyar kirina hezkirina ku ji dilê
pak û ji ûcdanê paqij û ji baweri-
ya bi dilî ve dizê ye. 6 Hinek kes
ji vana çewt bûne[3] û ketine axaf-
tinên vala; 7 dixwazin bibin ma-
mosteyê zagonê û ne gotinên ku
dibêjin, ne jî babetên ku di wê de
bi xwe bawer in fêhm dikin.
8 Lê belê em dizanin ku bona
yekî zagonê li gor derûniya wê
tîne cîh, zagon qenc e; 9 ji ber
em vêya dizanin ku, zagon ne
bona rastan, lê bona zagonne-
nasan û asêyan, bêxwedêyan
û gunehkaran, bona kesên bê
pîrozî û mindar in[4], yên dayik û
bavên xwe kuştine, 10 qesasan,
yên bêexlaqiya cinsî dikin, yên
qûlampara[5] ne, tucarên dîlan, de-
rewînan, bona kesên bi derewan
sondê dixwin û çi tiştên li dijberî
hînkariya zexm hebe bona wan
hatiye danîn; 11 li gor Mizgîniya
Xwedayê pîroz ji min re hatiye
emanet kirin, ev ûsa ye.

*Xwedê dilovan e*

K.Şa 26,9-20; 1.Kor 15,9-10

12 Ez ji Xudanê me Mesîh Îsayê
ku min xurt kiriye re şikir dikim;
ji ber ku min dilsoz hesiband û girt
xizmeta xwe; 13 demekê ez miro-
vek zalim, kanc û kufurbaz bûm.
Lê belê ez gihaştim dilovaniyê[6];
ji ber ku min bi nezanî, di bêba-
weriyê de kir; 14 lê belê bawerî û
xêra Xudanê me ya tevî hezkirina
di Mesîh Îsa de ye, bi zêdeyî pirr
bû. 15 Gotina ku, Mesîh Îsa bona
gunehkaran xelas bike hate dinê,
dilsoz e û ji her alî ve liyaqê qe-
bûlê ye; ji wan yê yekemîn ez im.
16 Lê belê Mesîh Îsa, bona ku ez
ji yên bi bawerî anînê dê bigihêjin
jiyana bê dawî re bibim mînak,
bona ku sebra xwe yî bê dawî
pêşiyê di min de pêşkêş bike di-
lovaniyê li min kir. 17 Bila rûmet
û bilindahî, di abadîna abadînan
de ji Xwedayê tenê, bê mirin,
nayê dîtin û Qiralê hemû deman
re be! Amîn.

1 Teşwîq kiribû.
2 Yên bêdawî û dirêj.
3 Xericîne.
4 Yên li berya pîroziyê bêrêz in.
5 Homoseksûel.
6 Ji min re dilovanî hate kirin.

*Têkoşîna qenc bidomîne*

1.Tîm 6,12; 2.Tîm 2,15-18

18 Ya kurê min Tîmotêyos, mîna
gotinên peyxamberî yên ji berê de
di derheqê te de hatine gotin, ez vî
emrî emanetî te dikim; da ku, tu
bi van têkoşîna qenc bidomînî.
19 Bi bawerî û ûcdanê paqij ve bi-
gire; hin kesan bi aliyekî danîna
ûcdanê paqij, di babeta baweriyê de
noq bûn[1]. 20 Hûmenêyos û Îskender
ji vana ne; bona ku hînî kufur neki-
rinê bibin, min wan da destê Îblîs.

*Li ser dua û peristinê*

Yêr 29,7; Yû 3,16-17; Îbr 2,9

2 Niha ez berî her tiştî teşwîqî
vêya dikim: Bona ku em di
rêya Xwedê de bi girêdanek tam
û di nav sergiraniyê de jiyanek
bêdeng û biaram bajon, bila ji bo
hemû mirovan, 2 qiralan û rêva-
birên cîhê bilind xwestek, dua, li
bergerîn û şikirî bên kirin. 3 Ji ber
ku ev li cem Xelaskerê me Xwedê
qenc û hêja ye; 4 ew dixwaze ku
hemû mirov xelas bibin û bigihêjin
zanîna rastiyê. 5 Ji ber ku tenê
Xwedayek û di navbera Xwedê û
mirovan de navdîtiyek heye; 6 ev jî
Mesîh Îsayê ku bûye mirov û bona
her kesî xwe fîdye daye; şahdeyiya
ku di dema li cîh de hatiye dayîn ev
e. 7 Ez ji vê şahdeyê re wekî waiz û
şagirt bim; – ez rastiyê dibêjim, de-
rewan nabêjim –; di bawerî û ras-
tiyê de wekî mamosteyê netewan
bim, ez hatim wezîfedar kirin.

*Di derheqê zilam û pîrekên bawermend de*

1.Pêt 3,1-6; 1.Kor 14,34-38; Tît 2,3-5

8 Niha, ez dixwazim ku bila zilam
bê hêrs û keftûleftê[2] li her derê
destên xwe yî paqij bilind bikin[3] û
dua bikin. 9 Mîna vêya bila pîrek
jî xwe ne bi guliyên por û zêr, an
înciyan, an kincên zehf giranbuha,
bi qiyafetekî[4] sade, lê li gor edebê
û bi awayekî pîvangî de 10 û – li
gor pîrekên xwedî teqwa ne –, bila
xwe bi karên qenc ve bixemilînin.
11 Bila pîrek bi bêdengî û bi
sernermiyek tam ve hîn bibe. 12 Lê
belê ez destûr nadim ku pîrek fêr
bike û bibe serwerê zilam; lê bila
bêdeng bibe. 13 Ji ber ku pêşiyê
Adem, piştre Hawa hate afirandin.
14 Û Adem nehat xapandin, lê belê
pîrek hat xapandin û sûc kir. 15 Lê
belê ger ew di rastdîtin, bawerî,
hezkirin û pîroziyê de bijîn, dê bi
welidandina zarok ve xelas bibe[5].

*Çavdêrî û wezîfedarên Civakê*

Tît 1,5-9; 1.Pêt 5,1-4

3 Ev gotina dilsoz e: Ger zilamek
çavdêriyê[6] bixwaze, xwesteka

---

1 Xerq bûn, fetisîn, an jî: Îflas kirin.
2 An jî: Bêguman, bêşik.
3 An jî: Vekin.
4 Girêdanek, wergirtinek.
5 An jî: Dê bi bûyîna zarok ve bête parastin.
6 Serperişt.

karekî qenc dike. 2 Niha bona zilamê ku bibe çavnêrîdar hewce dike ku, bêqisûr, mêrê pîrekekê, bitemkîn, aqilmend[1], xwedî întîzam, mêvanperwer, ji hînkirinê re bi huner, 3 ne dildayê xemrê be, ne zordest be, lê belê nerm, ne şerûd, ne hezkirê peran be; 4 divê rêvabirtiya mala xwe qenc çêke û gotinên xwe ji zarokên xwe re derbas bike û birêziyek bêkêmasî di mala xwe de amade bike; 5 – lê belê ger kesek nizanibe rêvabirtiya mala xwe bike, dê çawa Civaka Xwedê[2] bajo? – 6 Divê ne yekî nû baweriyê aniye be; ya na dibe ku li ber xurûrê keve û rastî daraziya ku Îblîs bi wê hatiye daraz kirin bê. 7 Bona ku nekeve rewşeke şermezarî û kemîna Îblîs, divê ji aliyê kesên derveyî[3] ve jî bi mirovek qenc bê nas kirin.

8 Mîna vêya, divê wezîfedarên Civakê[4] jî ne wekî kesên dugotinî, dildayê pirr xemrê, yên li pey qezenca bêheq ve diçin bin; 9 bila di ûcdanê paqij de wekî raz a[5] baweriyê biparêzin bin[6]. 10 Û bila vana pêşiyê bên ceribandin; ger ew bêqisûr bin, paşê bila wezîfê bistînin. 11 Mîna vêya divê pîrekan jî ne îftirakir bin, lê di têkiliyên xwe de bipîvan, serî giran û ji her alî ve ewledar bin. 12 Bila kesên bi pîrekekê tenê re zewiciye û yên zarok û malên[7] xwe qenc îdare dikin, bibin wezîfedar. 13 Ji ber ku yên ku wezîfa xwe qenc çêkirine, ji xwe re cîhekî qenc bi dest ve dixin û di baweriya di Mesîh Îsa de ye de dilawêriyek mezin qezenc dikin.

*Raza mezin*

Yû 1,1.14; 1.Yû 1,1-4; 4,1-3; 5,20

14 Ez van tiştan bi hêviya ku ezê di nêzîk de werim cem te dinivîsînim; 15 lê belê ger ez dereng bimînim, dixwazim ka dê di mala Xwedê ya Dêra Xwedê ye, ya ku sitûn û bingeha rastiyê ye de tevgera te çawa bibe tu bizanibe, ez dinivîsînim. 16 Û meziniya raza teqwayê nayê înkar kirin:
Xwedê di bedenê de hate xuyabûn, di Ruh de hate tesdîq kirin, ji milyaketan re xuyanî bû; ji netewan re hate waz kirin, di dinê de hate bawer kirin, di nava bilindahiyê de, bi jor ve hate girtin.

*Ji baweriyê vegerîn*

1.Yû 4,1-3; 2.Tîm 3,1-9.13; 4,3-4

4 Lê belê Ruh bi eşkeretî dibêje ku, di demên dawiyê de dê hin kes ji bawiriyê ve vegerin û ruhên xapînokî û hînkirinên cinan guh-

---

[1] Hişdar.
[2] Dêra Xwedê.
[3] Yên ku derveyî Dêrê ne.
[4] Wezîfedarên Dêrê, şemas.
[5] Sir.
[6] An jî: ...bila di ûcdanê paqij de wekî xwediyê raza baweriyê bin.
[7] Malbatên xwe.

darî bikin; 2 dê bi durûyiya de-
rewkiran ûcdanê wan mîna ku bi
hesinekî sorbûyî ve bête dax kirin;
3 dê ew zewacê qedexe bikin û di
vekişandina, ji xwarinên ku Xwedê
bona yên baweriyê anîne û bi ras-
teqîniyê ve dizanin, bi şikiryê bi-
xwin, afirandiye de emir bikin. 4 Ji
ber, her tiştên ku Xwedê afirandiye,
qenc in û ger bi şikiryê bê qebûl ki-
rin tu tişt neyê red kirin; 5 ji ber ku
her tişt bi gotina Xwedê û bi duê[1]
ve tê pîroz kirin.

*Xizmetkarê qenc*

2.Tîm,14-16; 1.Tîm 6,11-14; Tît 2,7-8.15

6 Ger tu vana ji birayan re şîret
bike, bi têrbûna bawerî û gotinên
hînkariya qenc ve tuyê ji Mesîh Îsa
re bibe xizmetkarekî qenc. 7 Lê
belê bêxwedatî û çîrokên ku li gor
jinepîran e red bike; lê belê xwe
di rêya Xwedê de perwerde bike!
8 Ji ber qenciya perwerde kirina
bedenê hindik e; lê belê teqwa ya
wada niha û dema bê dexlî wê ye,
ji her alî ve feydedar e[2]. 9 Ev gotin
ewledar e û ji her alî ve liyaqê qe-
bûl kirinê ye. 10 Ji ber ku em bona
vêya kedê didin û têkoşînê dikin;
ji ber, me hêviya xwe bi yê ku Xe-
laskerê hemû mirovan, bi taybetî
jî yê bawerkiran e, Xwedayê zindî
ve girê da.
11 Temmiya vana bide û hîn bike!
12 Bila tu kes civaniya te biçûk
nebîne; lê belê di gotinê de, di
tevgerê de, di hezkirinê de, di ruh
de, di baweriyê de û di safîbûnê
de ji bawerkiran re bibe mînak!
13 Heta ku ez bêm cem we, ji bo
xwendinê, teşfîq kirinê û hînkirinê
bixebite. 14 Li xelata ruhanî ya di
te de ye, ya bi peyxambertiyê û
bi destdana sazûmana kalepîran
ve ji te re hatiye dayîn re dilxavîtî
meke! 15 Di van tiştan de bi xîret
be; di vana de bijî[3], bila her kes
pêşveçûna te bibîne! 16 Li xwe û
hînkariya xwe miqate be; di wan
de bidomîne! Ji ber ku bi kirina
vêya tuyê him xwe, him jî kesên
te guhdarî dikin xelas bikî.

5 Bi zilamê pîr ve nepeke, lê
belê mîna bav, yên ciwan,
mîna birayên te bin, 2 pîrekên pîr,
mîna diya te bin, pîrekên ciwan bi
dilsafiyek tam, mîna ku xwuşkên
te bin, teşwîq bike.

*Pîrekên bî*

Lûq 2,36-37; Rom 16,1-2

3 Ji pîrekên bî yên di rastiyê de bî
ne re, birêziyê xuya bike. 4 Lê belê
ger zarok an jî neviyên pîrekekî bî
hebe, bila ew pêşiyê bi alîkirina
maliyên xwe meşa di rêya baweri-

1 Dua.
2 Kêrdar e.
3 An jî: Li ser van babetan bisekine; xwe bide vana ku...

yê de û deynê qenciyê dana ji me-
zinên xwe re hîn bibin; ji ber ku ev
li cem Xwedê hêja[1] ye. 5 Lê belê
ya ku bi rastî bî û tenê maye, hê-
viya xwe bi Xwedê ve girê daye;
bi şev û roj di lava û di dua kirinê
de dom dike. 6 Lê belê ya ku xwe
daye zewqê, hîn di jiyanê de miri-
ye. 7 Bona ku bêqisûr bin, temmi-
ya van tiştan li wan bike! 8 Lê belê
ger yek li yên xwe û bi taybetî jî
li maliyên xwe nenihêre, wekî ku
baweriyê înkar kiriye dibe û ji bê-
baweran xerabtir e!
9 Pîrekek bî ya bi qencî kirina xwe
ve tê nasîn, bi zilamek re tenê zewi-
ciye û ne di binya şêst salî de ye, 10
ger zarok mezin kiribe, ger mêva-
nan ezimandibe, ger lingê pîrozan
şuştibe, ger ji yên di tengasiyê de
ne re alîkariyê kiribe, ger xwe bi
her karê qenc ve bexşandibe, bila
navê wê li lîsta biyan ve bê nivîsan-
din. 11 Lê belê nivîsandina navê
biyên hîn jî ciwan red bike; ji ber
ku dema azweriyên wanî bedenî, bi
ser girêdana wanî bi Mesîh bê, dê
bixwazin ku bizewicin 12 û bi vî
awayî bi cûtina gotina pêşiyê daye
dê hikmê bigirin. 13 Tevî vêya bi
mal û mal gerê, dê bielimin terali-
yê û dê tenê bi elimandina teraliyê
nemînin, lê belê bi gotina peyvên
nakeve ser wan, dê bibin devtejiyê
ku destê xwe davêjin karên kesên
din. 14 Niha, ez dixwazim ku biyên
hîn ciwan in bila bizevicin, zarokan
bînin, rêvebirtî li malê bikin û tu fer-
senda îftirayan nedin neyaran. 15 Ji
ber ku jixwe hin kes çewt bûne û li
pey Îblîs ketine. 16 Ger merivê bî
yê pîrekek bawer kir hebin, bila ew
alîkariyê bi wan re bike û bona ku
Dêr alîkariyê bi biyên di rastiyê de
jî kesekî wan nîne re bike, bila wê
nexîne bin tu barî.
17 Kalepîrên ku qenc rêvebiriyê
dikin, bi zêdeyî jî yên ku kedê di-
din kelam û hînkirinê, bila du qatî
liyaqî hurmetê bêne dîtin. 18 Ji ber
ku Nivîsa Pîroz dibêje: Devê gayê
ku cêrê dike girê mede, û: Karker
heqdestê xwe, bi xwe heq dike.
19 Heta ku dudo an jî sê şahde
tune be, sûcdarkirinek di der-
heqê kalepîrekî de qebûl meke.
20 Bi yên ku guneh dikin re, li ber
hemûyan bipeke, da ku, bila yên
din jî bitirsin. 21 Bona tu van go-
tinên min bêalîkarî û bêcihêkirina
kesî bîne cîh, ez te li ber Xwedê
û Xudan Mesîh Îsa û milyaketên
hatine bijartin îkaz dikim. 22 Bona
dest dana ser yekî lez meke û nebe
şirîkê gunehên yekî din; xwe paqij
bigire!
23 Êdî tenê avê venexwe; lê bona
gedeka[2] xwe û nerehetiyên xwe yî
dem bi dem dest pê dike hinekê jî
xemrê vexwe.

1 Meqbûl e.

2 Made, firşik, an jî: Mîde.

24 Gunehên hin mirovan eşkere
ne, berê diçin daraziyê; lê belê
yên hin kesan jî li pey wan tên.
25 Mîna vêya, karên qenc jî eşkere
ne û yên ne eşkere ne jî nikarin
bên veşartin.

*Têkiliyên xulam û efendî*

Ef 6,5-8; Tît 2,9-10; 1.Pêt 2,18-20

6 Hemûyên di bin nîrê de ne,
bila efendiyê xwe liyaqî hurmeta bitûmî bibînin, da ku, bila
ji nav û hînkariya Xwedê re kufir
neyê kirin. 2 Lê belê yên efendi-
yên wan baweriyê anîne jî, bila bi
gotina çawa be em bira ne, bêrêziyê li wan mekin; lê belê bila hîn jî
zêde xizmetê bikin; ji ber ku yên
ji vê xizmetê qenciyê bibînin, bawerker û xoşewîst in. Van tiştan
bide hînkirin û teşwîq bike!

*Di rêya Xwedê de meşîn*

Rom 16,17-18; Îbr 13,5; Marq 4,18-19; Met 6,19-34

3 Ger kesek, hînkariyên cihê
belav bike û gotinên zexm, bi
gotinên Xudanê me Îsa Mesîh ve
û hînkariya ku li gor teqwayê ye
razî nebe, 4 bi nezaniya tiştekî
bi kubrê ve ketiye; lê belê ji ber
derxistina guftego û şerên bêjeyan
nexweş e; çavnebarî, keftûleft,
îftira, şikên xeraban, 5 keftûlefta
zilamên ku ramançewt bûyîne û
mehrûmê rastiyê ne, yên teqwayê
mîna rêya qezencê dizanin, ji vana
ve dibin; ji yên ûsa dûr bisekine!
6 Lê belê qenîetkirina bi teqwayê
ve qezencek mezin e; 7 ji ber ku
me ne tiştekî aniye dinê û ne jî em
karin ji dinê tiştekî bibin. 8 Lê belê
ger xwarin û kincên me hebin,
emê bi wan qenîet bikin. 9 Lê belê
yê ku dixwazin dewlemend bibin
jî, tên xapandin û dikevin kemînê,
ber bi gellek azweriyên bi zirar
û bêmane yê ku mirovan dibe
xerabûn û têkçûnê ve dikevin.
10 Ji ber ku rehekî[1] her tewr
xerabiyê hezkirina pera ye; hinek
kes, bi hewes kirina vêya ve ji
baweriyê ve vegeriyan û xwe bi
xwe gellek êşê dan xwe.

*Têkoşîna qenc bidomîne*

2.Tîm 2,22; 2,3-7; 4,1-8

11 Lê belê tu, ya mirovê Xwedê, ji
vana ve bireve; li pey rastiyê, teqwayê, baweriyê, hezkirinê, sebrê
û nermiyê ve bazde! 12 Têkoşîna
qenc, ya di oxra baweriyê de bidomîne û bi jiyana abadîn ya li ber
gellek şahdeyan wekî mukuriya
qenc, tu bi mukur anînê ve hatiye
dawet kirin, bigire. 13 Ez di hizûra Mesîh Îsayê li ber Xwedayê
ku jînê daye her tiştî û li ber Pontiyûs Pîlato ve şahdeyiyê li mukuriya qenc kiriye de vê temmiyê li
te dikim; 14 heta hatina Xudanê
me Îsa Mesîh tu emir bêqirêj û

---

1 Rîçal, rîç, an jî: Kok.

bêqisûr bigire; 15 yê pîroz û ser-
werê tekane, Qiralê qiralan, Xu-
danê xudanan, 16 xwediyê bêmi-
riniyê tenê, yê ku di ronahiya ku
mere nikare nêzîkî wê bibe de
disekine[1], yê ku tu mirov wî ne
dîtiye û ne jî dikare bibîne, dê wî
di dema hatiye bijartin de derxîne
holê; bila rûmet û qudreta bêdawî
ji wî re be! Amîn.

*Îkazên li dijî dewlemendiyê*

Lûq 12,15-21; Îbr 13,16; M.Sil 19,17

17 Ji yên ku di dinya niha de dew-
lemend in re temmiya, raman bi-
lind nebûniyê û ne bi bêqirariya
dewlemendiyê, lê belê bi Xwe-
dayê ku bona zewqê her tiştî bi
zêdeyî daye me ve hêviya xwe
girêdanê, 18 bona jiyana ku bi
rastî ye bigirin, bona demên ku dê
werin, ji xwe re bingehekî qenc
amade kirinê û qencî kirinê; 19 di
karên qenc de dewlemendbûnê,
bona belav kirinê amadeyiyê û
comerdbûnê, bike.

20 Ya Tîmotêyos, emanetê bi-
parêze; ji gotinê vala û ne pîroz,
ji pozberiyê ramanên ku bi xeletî
ji wan re dibêjin zanîn, xwe bi-
parêze! 21 Hin kesan bi îdîa ki-
rina vêya di derheqê baweriyê de
çewt bûn[2].

Bila xêr[3] bi te re be! Amîn.

---

[1] Rûdine.

[2] An jî: Hin kesên ku digotin em xwediyê vê zanînê ne, ji baweriyê ve xericîn.

[3] Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA DUWEMÎN JI TÎMOTÊYOS RE

## WÊRANDINA ŞÎRETKIRÊ CIWAN

*Pêşgotin*

Ev nameya ku bi peyxama Xwedê ve hatiye nivîsandin, nameya Nûçevan Pawlos ya dawîn e. Pawlos, dema li benda dardakirina xwe bû, vê nameyê ji Romayê ve nivîsandiye (4:6). Paşî gerên Pawlos, dîsa hatiye girtin. Navê vê girtina wî: "Girtina duwemîn" e. Pawlos di vê gera xwe de çûye Troasê jî û hinek alavên xwe daniye wir. Ji Tîmotêyos ve dixwaze ku wan alavên wî, ji wir bigire û bibe ba wî (4:9,11,13,21). Pawlos di vê gera xwe de çûye gellek cîhî. Li van cîhan, bi tenduristiya civakan re têkilî daniye û bi vî awayî xuya kiriye ku ew bi van xisûsiyetên xwe, serokek qenc û bona şîretkirê ciwan re jî wekokek li ber çava yî. Mîna di 1.Tîmotêyos de di vê nameyê de jî, îkazên di derbarê şagirtan de heye (2:14,16,18,23; 3:8,13; 4:3,4). Wekî din qala têkiliyên mirov û Xwedê (2:22), têkiliyên bi kesên çewt re (3:1-5) jî dike. Ev nameya dawîn di nava salên 65-67'an de hatiye nivîsandin.

*Destpêk û silav*

1 Li gor wada jiyanê ya ku di
Mesîh Îsa de ye, bi viyana
Xwedê, şagirtê Mesîh Îsa Pawlos,
2 ji lawê minî xoşewîst Tîmotêyos
re: Bila ji Bavo Xwedê û Xudanê
me Mesîh Îsa ve xêr, dilovanî û
xweşî (bi te re) be!

*Banga girêdaniya Mizgîniyê*

2.Tîm 4,1-5; Rom 1,16-17

3 Şev û roj bêsekin di duayên
xwe de, bi bîranîna te, ez ji Xwe-
dayê ku mîna bapîrên xwe bi
ûcdanek paqij ji wî re qûlitiyê
dikim re, şikir dikim. 4 Hêsirên
çavên te bi bîr ve tînim û bona bi
kêfxweşiyê ve tijî bibim, bi bêrî-
kirinê ve li benda dîtina te dimî-
nim. 5 Baweriya ji dilî ya di te
de bi bîr ve tînim; ez bawer im,
ew baweriya ku pêşiyê di pîrika
te Loîsê de û dawiyê di dayika te
Ewnîkê de bû, niha jî di te de ye.
6 Ji ber vê yekê, bi destdana minî
ser te tînim bîra te, tu xelata ku
Xwedê daye te geş bike[1]! 7Ji ber
ku Xwedê ne ruhê tirsonekiyê, lê

[1] Bicoşîne. An jî: Bi agir bike.

belê ruhê qudret, hezkirin û xwe
zeft kirinê daye me.
8 Niha, ji şahdeyiya Xudanê me û
ji min, yê di oxra wî de hatiye gir-
tin neşerme[1]; lê belê li gor qudreta
Xwedê, ji bo Mizgîniyê, tevî min
zehmetê bikişîne; 9 wî, me ne li
gor karên me, lê li gor armanc û
xêra xwe xelas kir û bangî jiya-
nek pîroz kir; ev xêr ji me re, di
Mesîh Îsa de berî destpêkê hatiye
bexşandin; 10 lê belê niha bi ha-
tina wî derketiye eşkeretiyê; Xe-
laskerê me Mesîh Îsa mirinê bê
çalak hiştiye û jiyan û bêmiriniyê
bi navgîniya Mizgîniyê derxistiye
ronahiyê. 11 Ez mîna waiz, şagirt
û hînkariya vê Mizgîniyê ve hatim
wezîfedar kirin. 12 Sedema minî
van êş kişandinan jî ev e; lê belê
ez şerm nakim. Ji ber, ez dizanim
ku bi kê bawer im û ez bawer im
ku, ew di wê hêza de ye ku, ya
wî emanetî min kiriye, heta wê
rojê ew ê bikaribe biparêze. 13 Bi
mînakiya gotinên zexm[2], yên ku
te ji min bihîstine, di baweriyê û
hezkirina ku di Mesîh Îsa de ye de,
bigire! 14 Emanetê qenc bi navgî-
niya Ruhê Pîroz, yê ku di me de
dimîne biparêze!
15 Tu dizanî ku hemûyên li
Asyayê ne, ji min zivirîn; Fîge-
los û Hêrmoxênis jî ji wan in.
16 Bila Xudan ji maliyên Onesî-
foros re dilovaniyê bibexşîne; ji
ber ku wî pirr caran min dilhênik
kir û ji zincîra min şerm nekir;
17 lê belê dema ew li Romayê bû, bi
xîret li min geriya û dît. 18 Xudan
bide wî ku, bila ew di wê rojê de ji
Xudan ve dilovaniyê bibîne! Û tu
zehf qenc pê dizanî ku, wî li Efesê
çiqas xizmet ji min re kiriye[3].

*Mîna leşkerekî qenc zehmetê bikişîne*

1.Kor 9,24-27; 2.Tîm 3,10-12; 4,5-8

2 Niha tu, ya lawê min, di xêra
di Mesîh Îsa de ye de xwurt
bibe. 2 Û tiştên ku te di nava gel-
lek şahdeyan de ji min bihîstine,
siparteyî zilamên ku bikaribin
hînî kesên din bikin û dilsoz in
re bike. 3 Mîna leşkerekî qenc
yê Mesîh Îsa, tevî min zehmetê
bikişîne! 4 Kesên leşkeriyê dike,
têkiliya xwe bi karên rojane re
nîne; bona xoşnûd kirina yê ku
wî bangî leşkeriyê kiriye dixe-
bite. 5 Û ger kesek jî beşdariya
pêşbaziya sporê dibe, ger li gor
qaîdeyan pêşbaziyê neke, nikare
taca serfiraziyê li xwe ke. 6 Cot-
karê ku kedê dide, divê bibe kesê
yekemîn yê parê ji zadê ve bistî-
ne. 7 Gotinên min baş bifikire û
dê Xudan[4] di her babetê de fêhm-
kariyê bide te!

1 Fedî meke.
2 Saxlem, rast.
3 An jî: ...li Efesê wî di çiqas tiştan de xizmetê kiriye.
4 An jî: Ji ber ku dê Xudan...

8 Îsa Mesîhê ku, li gor Mizgîniya
min, ji nîjada Dawid e û ji mirinê
ve vejiyaye di bîra xwe de bîne;
9 heta mîna sûckirekî li qeyd û
zincîran xistinê, ez di oxra wê de
zehmetê dikişînim; lê belê gotina
Xwedê ne girêdayiye! 10 Ji ber vê
yekê, bona yên hatine hilbijartin
ez baldirêjiyê[1] li her tiştî dikim;
da ku, bila ew jî bi bilindahiya
abadîn, bigihêjin xelasiya di Îsa
Mesîh de ye. 11 Ev gotina dilsoz
e: Ger em bi wî re miribin, em ê
bi wî re jî bijîn; 12 ger em li ber
xwe bidin, em ê bi wî re jî serwe-
riyê bajon; ger em wî înkar bikin,
ew ê jî me înkar bike; 13 ger em
dilsoz nemînin, ew ê dilsoz bimî-
ne; ji ber ku ew nikare xwe bi xwe
înkar bike[2].

*Karkerekî meqbûl û rû sipî*

1.Tîm 1,3-11; 1,18-20; 6,20-21;
Tît 1,9; 2,1; 3,8-11

14 Di hizûra Xudan de, nekirina
şerê bêje, yên ku dibe sedema
têkçûna yên ku dibihîzin û xey-
nî wê tu qenciya wê nîne li wan
temmî bike û van tiştan di bîra
wan de bîne. 15 Gotina rastiyê bi
rastî bikar bîne û bona ku tu xwe ji
Xwedê re wekî karkerekî meqbûl
û rû sipî pêşkêş bikî, xîretê bike.
16 Lê belê ji gotinên mindar û vala
ve bireve; ji ber ku yên bi vana
bikevin, dê di bêxwedêbûnê de
hîn jî pêş ve biçin 17 û dê gotinên
wan mîna lareşê ve belav bibin;
Hûmenêyos û Fîlîtos ji vana ne;
18 bi gotina, jixwe qiyamet bûye,
di derheqê rastiyê de çewt bûn û
baweriya hinekan bi serûbinî di-
kin. 19 Lê belê bingeha zexm ya
Xwedê avêtiye, bi gotinên: Xudan
yên aidê xwe ne nas dike[3] û: Heçî
kesên ku navê Mesîh bang dikin[4],
bila dûrî xerabiyê bisekinin! hati-
ye mor kirin û disekine.
20 Û di malekî mezin de tenê ne
feraxên zêr û zîv, lê belê feraxên
darinî û axînî jî hene û hinekan
bona karên birûmet û hinekan
bona karên bêrêz tên şuxulandin.
21 Niha ger kesek xwe ji van
tiştan safî bike, dê bibe feraxek
li gor armancên birûmet hatiye
pîroz kirin, ji efendiyê xwe re bi
fêde û amadeyî her karê qenc e.

*Jiyan û têkiliyên qûlê Xudan*

Tît 1,7-9; Aqûp 5,19-20

22 Lê belê ji azweriyên ciwanî
ve bireve û tevî kesên bi dilên
paqij ve bangî Xudan dikin, li
pey dadmendî, bawerî, hezkirin
û dilxweşiyê ve baz bide! 23 Lê
belê ketina guftegoyên bêaqil û
nezanî red bike; tu dizane ku vana

1 Tehemûl.
2 Li dijî derûna xwe nake, an jî: Xwe bi xwe înkar nake.
3 Dizane.
4 Heçî kesên ku bangî navê Xudan dikin, an jî: Navê Xudan dibêjin.

şer derdixin. 24 Û ji qûlê Xudan re
şer ne hewce ye; lê belê divê li dijî
herkesî rûnerm û bona hînkirinê
amadekar, tehemûlkar; 25 yên li
dijî disekinin bi nermî bîne rê be;
bona ku rastiyê fêhm bikin, dibe
ku Xwedê tobê bide wan[1] û 26 ew
ji kemîna Îblîsê bona xwestinên
wî bînin cîh wan bindest kiriye,
dê hişyar bibin.

*Rojên dawîn*

2.Pêt 2,1-22; Cihû 3,23; Tît 1,10-16

3 Vêya bizanibe ku, dê di rojên
dawîn de demên dijwar çê bi-
bin. 2 Ji ber ku dê mirov, hezkirê
xwe, zebûnê pera[2], pesnvedar, qur-
re, kufirbaz, ji dayik û bavan re bêî-
taet, nankor, mindar, 3 bê şewqat[3],
lihevneker, îftiraker[4], binketê nefsa
xwe, har, neyarê qenciyê, 4 xayîn,
bi inyad[5], ji xwe razî, ji Xwedê
zêdetir ji kêfê hezkir, 5 yên sûretê
teqwayê nîşan bidin û hêza wî în-
kar bikin bibin. Ji kesên ûsa ve dûr
bimîne! 6 Ji ber ku yên dikevin
hundirê xaniyan, bi tewr û tewr
azweriyên bi gunehan tijî ve diçin,
7 yên her dem hîn dibin; lê belê tu
carî nagihêjin zanîna rastiyê, yên
ku pîrekên bê xem[6] êsîr dikin, ji
vana ne. 8 Yanîs û Yambrîs çawa
li dijî Mûsa sekinîbin, vana jî bi vî
awayî li dijî rastiyê disekinin. Vana
mirovên ramanên wan xerabûyî û
di babeta baweriyê de hatine red
kirin in. 9 Lê belê dê nikaribin hîn
jî pêş ve herin; ji ber ku wekî di
mînaka wan de dê bêaqiliya vana
jî her kes bibîne.

*Ji Tîmotêyos re şîretên dawîn*

2.Kor 6,3-10

10 Lê belê te, hînkariya min, têki-
liyên min, armanca min, baweri-
ya min, sebra min, hezkirina min,
hêza minî berxwedanê, 11 zilm û
êşên min kişandiye, mîna ku tiştên
li Antaqyayê, li Qonya û Lîstrayê
hate serê min, ji nêzîk ve temaşe
kir. Min ji çi zilman re baldirêjî
kir û Xudan min ji hemûyan xelas
kir! 12 Û hemûyên ku aidî Mesîh
Îsa ne û dixwazin jiyanek li gor
teqwayê[7] bajon, dê zilmê bibînin.
13 Lê belê kesên xerab û sextekar,
bi xapînokî û xapandinê ve dê hîn
jî pêş ve biçin[8]. 14 Lê belê tu bi
zanîna ku ji kî ve hîn bûyînê; di
tiştên ku tu hîn bûyî û bawerî pê
anîne de bisekine; 15 ji ber ku tu
ji zarokantiya xwe ve bi nivîsên
pîroz, ên ku dikarin bi navdîtiya
baweriya di Mesîh Îsa de yî, bona

1 Dibe ku Xwedê ji wan re rêyek tobê veke.
2 Hezkirê pera.
3 Bê hezkirin.
4 Bêbext.
5 Zûkir.
6 Bê raman, şaşwaz, an jî: Yên ku ramanên wan lawaz in.
7 Li gor rêya Xwedê.
8 An jî: Hîn jî bêtar bibin.

xelasiyê te zanyar bikin ve dizanî.
16 Her Nivîsê ku peyxama Xwe-
dê ye û bona hînkirin, azirandin,
anîna rêyê û perwerdekirina di
rastiyê de ye jî qenc e; 17 da ku,
zilamê Xwedê bona her karê qenc
hatiye xemilandin bûnê ve ra-
yedar bibe.

*Gotina Xwedê waz bide*

K.Şa 20,18-32; 2.Tîm 2,3-7; Cihû 3;
1.Tîm 4,12-16

4 Di hizûra Xwedê û Mesîh Îsa,
yê ku zindî û miriyan daraz
bike de, bona heqê hatin û serwe-
riya wî emir didim te: 2 Kelamê[1]
waz bide; di wext û bêwextiyê de
vî karî bidomîne; bi hemûya te-
hemûl û perwerdeyê hişyar bike,
biazirîne û teşwîq bike! 3 Ji ber,
dê demek ûsa bê ku, dê ew xwe
nesipêrin hînkariyek zexm; lê
belê bona ku gotinên guhê wan
difirkînin[2] guhdarî bikin, dê ma-
mosteyên li gor azweriyên xwe li
dora xwe bicivînin 4 û dê guhên
xwe ji rastiyê ve bizivirînin û ber-
bi çîrokan ve çewt bibin.
5 Lê belê tu di her tiştî de hişyar
be, zehmetê bikişîne, karê waz ki-
rina Mizgîniyê bike, xizmeta xwe
bibe serî!
6 Ji ber ku ez jixwe tême qurban
kirinê[3] û dema cuda bûna min ha-
tiye. 7 Min têkoşîna qenc kir, baz-
danê qedand û baweriyê parast;
8 ji niha pê ve taca rastiyê bona
min amade disekine; Xudanê ku
darazkerê dad e, dê wê rojê, wê
bide min û ne tenê min, lê belê
dê bide hemûyên ku ji hatina wî
hezdikin jî.

*Silav û xwestekên taybetî*

9 Bona zû hatina cem min, xîret
bike! 10 Ji ber, bona ku Dîmas ji vê
dinê hez kir, dev ji min berda û çû
Selanîkê; Kîreskîs çû Galatyayê,
Tîtûs jî çû Dalmaçyayê. 11 Li cem
min tenê Lûqa heye. Marqos jî big-
re û bi xwe re bîne; ji ber ku ew
bona xizmetê, ji min re zehf bifêde
ye. 12 Lê belê min Tîhîkûs şand
Efesê. 13 Dema tu hat eba min, pir-
tûkan û bi taybetî jî postên nîvîsan
yên min li Troasê daniye cem Kar-
pûs bi xwe re bîne.
14 Îskenderê sifirvan[4] gellek xera-
biyan li min kir; dê Xudan bersiva
kirinên wî bide wî! 15 Tu jî xwe ji
wî biparêze; ji ber ku bi dijwarî li
dijî gotinên me rabû.
16 Di parastina minî pêşîn de,
kesekî li aliyê min derneket,
hemûyan min berdan[5]; bila
hesabê vêya ji wan ve nê pirsîn.
17 Lê belê bona ku gotina waz
kirinê bi navgîniya min ve bêkê-

1 Gotina Xwedê.
2 Qilî dikin, an jî: Mist didin.
3 Ji ber ku ez jixwe dibim qurban, an jî: Xwîna min jixwe mîna qurbana vexwarinê bê rijandin.
4 Paxirvan.
5 Terikand.

masî bê daxuyanî kirin û bona
hemû neteweyan vêya bibihîzin,
Xudan li cem min sekinî û min
xurt kir û ez bi vî awayî ji devê
şêr ve xelas bûm! 18 Dê Xudan
min ji her xerabiyê ve xelas bike
û dê bona serweriya xwe yî ya
ezmanî min xelas bike. Bila bi
abadîna abadînan ve ji wî re bi-
lindî be! Amîn.
19 Silavê ji Prîska û Akvîla û ji
maliyên Onesîforos re bibêje.
20 Êrastûs li Korîntê ma; lê belê
min Trofîmos li Mîletê nexweş
hişt. 21 Berî ku zivistan bê, bona
hatina xwe xîret bike! Êybûlos
û Pûdens û Lînos û Klawdiya û
hemû birayan ji te re silav dikin.
22 Bila Xudan Îsa Mesîh bi ruhê te
re be! Bila xêr[1] bi we re be! Amîn.

[1] Qencî, kerem, an jî: Lutif.

2 Bila zilamên kalepîr di têki-
liyên xwe de giran, bipîvanî, bi
rastdîtin û di bawerî û hezkirin û
sebrê de zexm bin. 3 Mîna vêya,
divê jinên pîr di kirinên xwe de ne
îftirakir û ne dîlê xemrê pirr bin;
lê bila bibin mamosteyên birêz,
yên qenciyê; 4 da ku, bona ji go-
tina Xwedê re neyê kufir kirin,
bila pîrekên ciwan, bi awayekî, ji
zarokên xwe hez bikin û ji mêrê
xwe hez bikin 5 û bi rastdîtin bin,
dil pak, di malên xwe de bixebat
bin û bengî zilamê xwe bibin, per-
werde bikin.
6 Mîna vêya, zilamên ciwan jî bi
rastdîtinê ve bi hewes bike. 7 Bi
kirina ya qenc, di her babetê de ji
wan re bibe mînak. 8 Di hînkariya
xwe de giran û durust be, gotinên
rast, yên ku kes li hember nese-
kine bibêje ku, bila yên dijrabe-
riyê li me dikin, gotinekî tahl di
derheqê me de bibêje nebînin û
bişermin.
9 Dîlan, bona ku di her babetê
de bengî efendiyên xwe bibin, bi
hewes bike; bila bengî efendiyên
xwe bibin; bêyî dana bersivek ne
li cîh 10 û bêyî kirina diziyê, ew-
ledarbûna xwe bitûmî bidin xuya
kirin; da ku, bila hînkariya di der-
heqê Xwedayê ku Xelaskarê me
ye de ji her alî ve bikêş[1] bikin.

*Xêra Xwedê ji bo xelasiyê derketiye holê*

1.Pêt 1,10-21; Rom 12,1-2; 1.Kor 6,20

11 Ji ber ku xêra Xwedê, ji bo
hemû mirovan xelasiyê anînê ve,
derketiye holê; 12 ew hînî me
dike ku, divê em bêxwedê bûnê
û azweriyên dinê red bikin, 13 bi
benda derketina holê û rastbûna
hêviya pîroz ya bilindahiya Xwe-
dayê bilind û Xelaskerê me Îsa
Mesîh, mayînê, em di dinya niha
de, li gor temkîn[2] û bawerî û teq-
wayê[3] bijîn; 14 wî, xwe di oxra
me de radest kir[4], da ku, me ji her
fesadiyê ve xelas bike, safî bike û
netewa xas ya ku bona karên qenc
bi xîret e, bona xwe paqij bike.
15 Vana bi rayedariyek tam ve
bighîne û guhdaran bi xwestek û
qanih bike. Bila tu kes te biçûk
nebînin[5]!

3 Bîne bîra wan ku bila bengî
rêvebiran û dageriyan bibin,
îtaetkar bin û bona kirina her
tiştên qenc divê amade bin; 2 bila
ji kesekî re kufr mekin, ne şerger
bin, lê bila serînerm bin; bila bi
hemû mirovan ve têkiliyên xwe
ji her alî ve bi nermî deynin. 3 Ji
ber ku demekê em jî kesên fêhm
nekir, bêîtaet, xapînokî, dîlên az-
werî û zewqên tewr bi tewr, yên
di nava xerabî û çavnebariyê de

---

1 Dilkêş, birûmet.
2 Bipîvan.
3 Tirsa qedexeyên baweriyê.
4 Teslîm kir.
5 Xor nebînin.

dijiyan, yên ji wan dikerihîn û
yên ji hev û din dikerihîn bûn.
4 Lê belê gava qencî û hezkirina
Xelaskerê me Xwedê, ya ku ji
bo mirovan e, xuya kir; 5 ne bi
karên ku me bi rastiyê ve kirine,
lê bi dilovaniya xwe, bi şuştina
ji nû ve welidandinê ve 6 û bi nû
kirina Ruhê Pîroz ya bi navgîniya
Xelaskerê me Îsa Mesîh ve pirr û
pirr bi ser me ve rijand, me xelas
kir; 7 da ku, em bi xêra wî bi saf-
kirinê ve li gor hêviya jiyana bê-
dawîn bibin mêrasker. 8 Ev gotin
dilsoz e û bona yên baweriya xwe
bi Xwedê ve anîne, bi karên qenc
ve mijûlbûnê bifikirin, ez dixwa-
zim ku, tu, di derheqê van tiştan
de, bi ewlekarî teyît bike[1]. Vana, ji
mirovan re, qenc û bifêde ne.

*Xwe ji gengeşiyên bêaqilî biparêze*

1.Tîm 6,3-5; 2.Tîm 2,23-26

9 Lê belê xwe ji gengeşiyên bêa-
qilî û li ber hev dana darê nîjadê
û ji şer û keftûleftên di derheqê
zagonê de ne, biparêze; ji ber ku
ew tiştên bêfêde û vala ne. 10 Paşî
îkaz kirina yekemîn û duwemîn,
têkiliyên xwe ji kesê partîvan[2]
ve bibire. 11 Tuyê bizanibe ku,
kesekî wusa, ji rê ve derketiye û
xwe bi xwe mehkûm kirinê ve gu-
nehan dike.

*Silav û xwestekên dawîn*

12 Dema min Artemas, an jî
Tîhîkûs ji te re şand neşand, xîret
bike ku tu were cem min Nîko-
polîsê; ji ber, min qirar da ku ez
ê zivistanê li wir derbas bikim.
13 Dema tu, zagonzan[3] Zênas û
Apollos bi rê ve bikî, bala xwe
bide ku bila tu kêmasiyên wan
tune bin! 14 Û bila yên me jî hînî
xwe dana karên qenc ve bibin; bi
vî awayî dê motajiyên bingehîn bi
dest ve bixin û dê jiyanek bê mêw
nedomînin!
15 Hemûyên ku li cem min in,
silavê li te dikin! Silavê ji yên di
baweriyê de ji me hez dikin re bi-
bêje! Bila xêr[4] bi we hemûyan re
be! Amîn.

---

1 Bipejirîne.
2 Firqevan.
3 Hiqûqnas.
4 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA PAWLOS YA JI FÎLÊMON RE

XWESTIN BONA EFÛKIRINA KESÊ BISÛC

*Pêşgotin*

Nûçevan Pawlos vê nameya xwe di navbera salên 60-64'an de ji Romayê ve, bona Fîlêmon nivîsandiye û di nameya xwe de xwestiye ku Onîsîmûs yê ji efendiyê xwe ve reviyayî, bila bê efûkirin (Kolosiyan. 4:7-9).
Bawerkirên li Kolosê ne, di mala Fîlêmon de diciviyan (2). Dihat zanîn ku, Fîlêmon, alîkariyê bi xizanan re dikir (5-7,22). Xulamê Onîsîmûs ji mala wî reviya çû Romayê, li wir rastî Pawlos hat û bawerî bi Mesîh anî (10). Dema Onîsîmûs reviyabû, neheqiyê li efendiyê xwe kiribû (18). Pawlos dixwaze ku Onîsîmûs bê efû kirin, bi vî awayî wekokê dide û tîne ziman ku, Xelasker Îsa, di nava Bav û mirovên gunekar de navdîtiyê kiriye (12-14).
Ev nameya ku, wekheviya efendî û xulam tîne ziman, ketiyan, bêhêviyan û gunehkaran bi metirsî dike.

*Destpêk*

1 Ji Pawlos, girtiyekê Mesîh Îsa û
ji birayê Tîmotêyos ve, ji xoşewîst
û hemkedkarê me Fîlêmon re 2 û
ji xwuşka me Afiya re û ji Arxî-
poyê ku me pev re têkoşînê daye
û ji Dêra ku li mala te ye re: 3 Bila
ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa
Mesîh ve xêr û xweşî ji we re be!

*Şikiriya ji bo bawerî û*
*hezkirina Fîlêmon*
Kol 1,3-8

4 Ez bi bihîstina hezkirin û bawe-
riya te yî ji Xudan Îsa re û ji hemû
pîrozan re, ji Xwedayê xwe re
şikir dikim 5 û di duayên xwe de
her tim te bi bîr ve tînim; 6 da ku,
di zanîna hemû tiştên qenc yên
ku di we de ne de, beşdariya te yî
baweriyê bila bona Mesîh kiryar
be. 7 Ji ber ku hezkirina te ji min
re bû çavkaniya dilşayiyek mezin
û xemrevîniyê; ji ber ku birayê
xoşewîst, dilên pîrozan bi navgî-
niya te fireh bû.
8 Ji ber vê yekê, çawa ku bona tiştê
birêk ji te re emir bikim, di Mesîh
de ez gellekî wêrek im[1], lê 9 ez,
Pawlosê kalepîr û niha jî girtiyê
Mesîh Îsa, bi hezkirinê ve ji te rica
kirinê çêtir digirim. 10 Ji bo lawê

1 Gellek cesareta min heye.

xwe Onîsîmûs, yê ku ez di zin-
cîrên xwe de jê re bûm bav, 11 yê
demekê ji te re bê fêde bû, lê belê
niha ji te re û ji min re bi fêde ye,
ji te rica dikim; 12 wî, yanê, dilê
xwe ji te re şûnda dişînim. 13 Min
dixwest ku heta dema ez di oxra
Mizgîniyê de girtîbim dêvla te
bona ku xizmetê ji min re bike, li
cem xwe bigirim; 14 lê belê heta
ku erêkirina te nebe, min nexwest
ku tiştekî bikim; da ku, bila qenci-
ya ku tu bike, ne ji hewcedariyê, lê
belê ji dil ve bibe. 15 Ji ber ku de-
mekî cudabûna wî ya ji te, dibe ku
bona vêya bû, yanê, 16 êdî tuyê wî
ne mîna qûl[1], lê ji qûlan ve bilindtir,
bi taybetî bona min, lê belê hîn pirr
zêde him di bedenê de, him jî di
Xudan de, bona te dê mîna birayek
xoşewîst, abadîn[2] bibe yê te bû.
17 Niha ger tu min rêhevalê xwe
dihesibîne, wî mîna ku tu min
qebûl dike qebûl bike. 18 Ger
wî birêziyekî ji te re kiribe, an jî
deynê wî hebe, vêya li hesabê min
bihesibîne. 19 Ez, Pawlos vêya
bi destê xwe dinivîsînim: Ez ê
berdêla wê bidim! Herhal hewce
nake ku ez bibêjim tu heta jiyana
xwe jî deyndarê min î. 20 Belê, ya
birayo, bila di Xudan de fêdeyek
te ji min re bibe; di Mesîh de dilê
min fireh bike!

*Xwestekên şexsî û silav*

Kol 4,10-18

21 Ez bi bawerbûna îtaet kirina te û
bi zanîna tuyê bi zêdeyî xwestekê
min çêbike, ji te re dinivîsînim.
22 Tevî vêya ji min re jî qonaxekî
amade bike; ji ber, ez hêvî dikim
ku, ez ê bi navgîniya duayên we ji
we re bême bexşandin.
23 Êpafrasê di Mesîh Îsa de he-
valê minî girtîgehê, 24 hemked-
karên min Marqos, Arêstarqos,
Dîmas û Lûqa silavê li te dikin.
25 Bila xêra[3] Xudanê me Îsa
Mesîh bi ruhê we re be! Amîn.

---

1 Koletî.
2 Bêdawî.
3 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA JI ÎBRANIYAN RE

## AVAKIRÊ SERETA

*Pêşgotin*

Ev nameya girîng, axaftina Xwedê ya bi mirovan re ye. Navê nivîskarê wê jî nayê zanîn. Tê xuya kirin ku, kesên nameyê standine, bona dilsoziya Mesîh gellek êşan kişandine (10:32,34). Vana berî demekî dirêj dev ji Cihûdiyê berdane û gîhaştine baweriya Mesîh. Her çiqas, ger li rûyê erdê cîhê wan tunebe jî (6:11-12; 11:8-10) gîhaştine bajarê li bilindahiyê yê Xwedayê zindî (12:22). Hinek rêvebir ji jiyanê ve ketine (13:7). Name bi peyxama Xwedê, di navbera salên 60-70'yan de hatiye nivîsandin.

Kesên nameyê girtine, perwerdebûyî û baqil bûn. Çi heye ku, di baweriyê de sist bûne (5:11; 6:12). Bi kurtî, Cihûdan kêm mabû ku vegerin kevneşopên xwe.

Nuxteya nameyê ya bi giranî, îkaz kirina bawerkiran e. Kevneşopên ku wan berdabûn, tiştekî ne kamil e û bi demê ve hatiye tengasî kirin. Lê baweriya Mesîh, kamilî (7:9) û bêdawîbûnê dide (5:9; 9:12,15; 13:20).

Serokkahîntiya Îsa Mesîh, ya ku li bilindahiyan bi çalak e û xelasiya ku pêk aniye, bandora wê bêdawî ye (5:9; 9:12, 15; 13:20; 9:14; 10:14).

Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Bêberiya Mesîh, birrên 1 û 2
2. Bêberiya Serokkahîntiya Mesîh 3:1-10:18
3. Pêşkêşiya Mesîh, ketina qatê Xwedê pêk tîne 10:19-12:29
4. Teşwîqkirin, birra 13

*Xwedê di Lawê xwe de ji me re axifî*

Yû 1,13.14; Kol 1,15-17

1 Xwedê di demên kevn de di
peyxamberan de, bi gellekî
caran û bi pirr teheran ji bavan re
axifî, 2 di dawiya van rojan de di
Lawê xwe yê ku bi navdîtiya wî
aleman afirandiye û kiriye mêraskerê her tiştî de ji me re axifî;
3 ew, şewla bilindahiya wî û xuyakirina rasteqîn ya gewhera wî
ye û bi gotina xwe yî bi qudret, her

*1* Dikişîne.

tiştî hildigire[1]; paşî ku ji gunehan ve
safîbûnê pêk anî, di bilindahiyan de
li aliyê rastê yê Mezinahiyê rûnişt.

*Law ji Milyaketan bilindtir e*

Ef 1,20-23; 1.Pêt 3,22; Kol 2,18-19

4 Û ji milyaketan her çiqas bû
mêraskerê navekî çêtir, ji wan
ewqasî derece hîn jî çêtir bû.
5 Ji ber ku wî ji kîjan milyaketê re
kengî gotiye: Tu Lawê min î, îro
ez ji te re bûme Bav[1]?
Û dîsa: Ez ê ji wî re bibim Bav û
ew ê jî ji min re bibe Law[2]?
6 Û dema ew yê pêşiyê bûyi-
ye dîsa dişîne dinê, dibêje: Bila
hemû milyaketên Xwedê ji wî re
peristinê bikin! 7 Û di derheqê
milyaketan de dibêje: Milyaketên
xwe dê bike ba û xizmetkarên
xwe bike pêtên agir[3].
8 Lê belê di derheqê Law de
dibêje: Ya Xwedê, texta te heta
bêdawîbûnê dê bimîne û gopala[4]
dadî, gopala serweriya te ye.
9 Te ji rastiyê hez kir û ji xerabiyê
kerihî; bona vêya Xwedê, Xwe-
dayê te, te bi rûnê dilxweşiyê ve,
ji hevalên te zêdetir mesh kir[5]!
10 Û: Ya Xudan, di destpêkê de,
te bingeha erdê avêt; ezman jî
karên destên te ne.
11 Dê ew ê tune bibin, lê belê tuyê
bimînî[6] û dê hemû mîna kincekî
kevin bibin.
12 Tuyê wan mîna xeftanekî
bade[7] û dê ew mîna kincekî bên
guherandin; lê belê tu her tim
wek xwe yî û dê salên te neqe-
din[8].
13 Lê belê ma wî ji kîjan milya-
ketê re kengî gotiye: Heta ku ez
neyarên te ji lingên te re pêlik
deynim, li rastê min rûnê[9]?
14 Ma ew[10] hemû ne ruhên xiz-
metkar, yên bona ji kesên ku dê
xelasiyê mêras bigirin re xizmetê
bikin, hatine şandin in?

*Serokkahînê dawîn û rayedar*

Îbr 4,1; 12,25

2 Ji ber vê yekê, bona ku bi her-
kê ve nekevin û neyên xiriqan-
din, divê em hê jî zêdetir bala xwe
bidin tiştên ku me bihîstine. 2 Ji
ber ku ger gotina bi navgîniya
milyaketan ve hatiye têgihandin
pêdandî bû be û ger her sûc û her
bêîtaetî bersiva ku heq kiriye gir-
tibe, 3 ger em dilxavî ya xelasiyek
ûsa mezin bikin, ma em ê çawa bi-
revin? Ev xelasiya, di destpêkê de
bi navgîniya Xudan ve hate gotin,
ji aliyê kesên ku bihîstine ve ji me

1 Zebûr 2:17
2 (2.Samûyêl 7:14)
3 Zebûr 104:4
4 Asa.
5 Zebûr 45:6-7
6 Baqî, payîdar.
7 Bipêçe.
8 Zebûr 102:25-27
9 Zebûr 110:1
10 Milyaket.

re hate tesdîq[1] kirin; 4 Xwedê jî
bi nîşanan, bi mûcîzetên tewr bi
tewr, bi nuwazeyan û bi xelatên
Ruhê Pîroz li gor xwestina xwe
tevî wan şahdeyiyê kir.

*Îsa Mesîh xwe bi xwe nizm kir*

Fîl 2,6-11; Gal 4,4-5

5 Ji ber ku wî, alemê ku em di der-
heqê wê de dibêjin, ya ku dê were
bengî milyaketan nekir. 6 Lê belê
yekî li derekê, şahdeyiyê kir û got:
Mirov çî ye ku, tu wî di bîra xwe
de bîne, an jî lawê mirov çî ye ku,
tu li wî bigere?
7 Te wî ji milyaketan ve hinek
nizm kir; te taca bilindahî û rû-
metê li wî kir û li ser berhemên
destên xwe te wî wezîfedar kir.
8 Te hemû tiştan bengî bin lingên
wî kir[2].
Ji ber ku hemû tiştan ji wî re bi
bengî kirinê ve, tu tiştekî nehatiye
bengî wî kirin nehişt. Lê belê, niha,
em hîn nabînin ku hemû tiştan ji
wî re hatine bengî kirin. 9 Lê belê
em Îsayê ku hinekî ji milyaketan
ve nizmtir hatiye danîn, yê bi xêra
Xwedê, ji bona her kesî mirinê
tahm bike di dawiya êşa mirinê, ya
ku kişandiye de, bi şiklê taca bi-
lindahî û rûmetê lê kirine dibînin.
10 Ji ber, dema ku gellek lawan
digehîştand bilindahiyê, gîhandina
serokê wanî ji êşan rayedariyê, li
gor wî dibû ku her tişt bona wî û
bi navgîniya wî hene. 11 Ji ber ku
yê pîroz dike û yên tên pîroz kirin,
hemû ji yekî ne; ji ber vêya ye ku,
ew dema ji wan re bira dibêje, fedî
nake, lê dibêje: 12 Ez ê navê te
bangî birayên xwe bikim, di nava
Civakê de, ez ê bi qesîdeyan ve
pesnê te bidim[3]!
13 Û dîsa: Ez ê bi wî bawer bi-
bim.
Û dîsa: A vay, ez û zarokên ku
Xwedê dane min[4].
14 Ji ber ku zarok ji goşt û xwînê
ve pardar in, ew jî bi eynî şiklî ji
van tiştan re bû pardar, da ku, yê
xwediyê hêza mirinê bû, yanê,
Îblîs, bi navgîniya mirinê ve be-
tal[5] bihêle 15 û hemû kesên di
hemûya dema jiyana xwe de ji
berya tirsa mirinê bûne dîl, azad
kir. 16 Ji ber ku ew alîkariyê ne
ji milyaketan re, lê belê ji yên ji
nîjada Birahîm ve tên re dike.
17 Ji ber vêya ji her alî ve divê
mîna birayên xwe biba; da ku,
bila di xizmeta xwe yî ji Xwedê
re de bibe Serokkahînekî dilovan
û dilsoz û bikaribe ji gunehên gel
re kefaretê bike. 18 Ji ber ku bona
ew hat ceribandin û êşê kişand,
dikare alîkariyê li yên tên ceri-
bandin re bike.

1 Erêyandin, erêkirin.
2 Zebûr 8:4-8
3 Zebûr 22:22
4 Îşaya 8:18
5 Tune bike, bêtesîr bike.

*Îsa û Mûsa*

3 Bona vêya, ya birayên pîroz,
yê ku şirîkê banga ezmanî ne,
çawa ku Mûsa di hemûya mala wî
de dilsoz bû, 2 li Îsayê Serokkahîn
û Şagirtê mukuriya[1] me, yê ku ji yê
wî bi wezîfedar kiriye re dilsoz e,
binihêrin. 3 Ji ber, mîna ku yê xanî
çêkiriye, ji malê ve zêdetir birêziyê
dîtiye, ew jî, ji Mûsa zêdetir liyaqî
bilindahiyek mezintir hatiye hesi-
bandin. 4 Ji ber ku her xanî ji ali-
yê çêkirekî ve tê çêkirin, lê belê di
rastiyê de çêkirê her tiştî Xwedê ye.
5 Mûsa bona ku şahdeyiyê li gotinên
di demên were de bê gotin bike, di
hemû mala wî de mîna xizmetka-
rekî dilsoz bû; 6 lê belê Mesîh, li
ser mala wî mîna lawekî dilsoz bû;
ger em cesaret û hêviya ku em bi wê
pesnên xwe didin heta dawiyê bê
sistkirin bidomînin, mala wî em in.

*Îkazên li dijî bêbaweriyê*

2.Kor 3,13-16; 4,3-4

7 Ji ber vê yekê, mîna ku Ruhê
Pîroz dibêje:
Ger îro hûn dengê wî bibihîzin,
8 li çolê, mîna di roja ceribandinê
de, di hêrsê de be, dilên xwe tund
mekin[2].
9 Li wê derê kalikên we min bi
hêçandinê ve ceribandin û çel salî
karên min dîtin.
10 Bo vê sedemê ez ji wê nifşeyê
xeyidîm û gotim:
Dilê wan tim ji rê ve çewt dibe,
rêyên min jî hîn nebûn.
11 Mîna ku di hêrsa xwe de sond
xwarim, dê tu carî nekevin warê
minî rehetiyê[3]!
12 Ya birano, bala xwe bidin, bila
di we tu kesî de dilxerabiya bêba-
weriyê ya ji Xwedê ve dûr dike-
ve tune be! 13 Lê belê: Her ku,
roj îroj e, hev û din her roj teşwîq
bikin; da ku, bila tu kes ji we bi
xapînokiya gunehan ve tund[4]
nebe! 14 Ji ber ku ger em ewle-
bûna xwe yî di destpêkê de sist
nekin û heta dawiyê bidomînin,
wekî em bibin şirîkê Mesîh dibe[5];
15 heta ku tê gotin:
Ger îro hûn dengê wî bibihîzin,
mîna di hêrsê de bû, dilê xwe tund
mekin[6].
16 Ji ber ku gava bihîstin, yên hêrs
bûbûn kî bûn? Ma ne hemûyên
di serokantiya Mûsa de ji Misirê
derketine bûn? 17 Û ma ew çel
salî ji kîjanan re xeyidî? Ma ne
ji yên gunehan kirine û cesedên
wan li çolê ve hatine raxistinan
re? 18 Û xeynî bêîtaetkeran[1], di
derheqê kê de sondê xwar ku ew
ê nekevin warê rehetiya wî? 19 Û
em dibînin ku, ew ji berya bêba-
weriyê neketin wir.

---

1 Îqrar.
2 Hişk mekin.
3 An jî: Aramiyê, Zebûr 95:7-11
4 Hişk.
5 An jî: Emê bibin şirîkê Mesîh.
6 Hişk mekin, Zebûr 95:7-8

*Ketina warê rehetiyê bi baweriyê ve mimkûn e*

Rom 9,30-33; 10,4-13; Îbr 10,38-39

**4** Niha, hîn wada ketina warê
rehetiya wî[2] didome, ji ber
yekî ji we bona ku ji wê şunda
mayi xuyani nebe, em bitirsin!
2 Ji ber ku mîna wan, ji me re
jî mizgîniyek xelasiyê hate waz
kirin[3]; lê belê, ji ber, gotina ku
bihîstibûn ji aliyê yên bihîstibûn
ve bi baweriyê ve nekirin yek,
qenciya gotinê ji wan re çênebû.
3 Ji ber, mîna ku: Wekî min di
hêrsa xwe de sond xwar, dê ew
ê nekevin rehetiya min[4], gotiye,
em, yên ku baweriyê anîne, dê
bikevin wê rehetiyê; lê tevî vêya,
karên wî ji avakirina dinê ve qe-
diyaye. 4 Ji ber ku wî di derekê
de di derheqê roja heftemîn de
wusa gotiye:
Û Xwedê di roja heftemîn de ji
hemû karên xwe rawestiya[5] û 5 li
vî cîhî dîsa gotiye:
Dê ew ê nekevin rehetiya min!
6 Niha, ji ber pêdandiye ku, yên
pêşiyê hatine mizgînî kirin dê ji
ber bêîtaetiyê nekevinê, lê hine-
kan dê bikevinê, 7 piştî ewqas
demî, bi navgîniya Dawid ve:
Îroj, dibêje û dîsa rojekê tayîn[6]
dike; herweha ji berê ve:
Ger îro hûn dengê wî bibihîzin,
dilê xwe tund mekin[7]! hatiye go-
tin.
8 Ji ber ku ger Yeşû rehetiyê
bida wan, dê li paşî van tiştan,
di derheqê rojekê din de negota.
9 Bi vî awayî, rawestana rojek
Sebtê ji gelê Xwedê re dimîne.
10 Ji ber, Xwedê çawa ku ji
karên xwe ve rawesta, dê yê
têkeve rehetiya wî jî, bi xwe ji
karên xwe raweste. 11 Niha,
bona ku bi eynî bêîtaetiyê kesek
nekeve, em ji bo ketina wê rehe-
tiyê xîret bikin.

*Gotina Xwedê zindî ye*

12 Ji ber ku gotina Xwedê zindî
ye û bi bandûr e[8], ji her şûrê bi
du devî hîn tûjtir e û heta can û
ruh, mêjî û movikan ji hev û din
cuda bike, dikare here kûrahiyê;
armanc û ramanên dil, daraz dike.
13 Û li ber wî mexlûqek veşartî
nîne; lê belê li ber çavên yê ku
karên me bi wî re ye, her tişt tazî
û vekirî ne.

*Serokkahînê me Îsa Mesîh*

Îbr 9,11-12.24; 10,21-23; 2,17-18

14 Niha bona ku Îsayê Lawê Xwe-
dê Serokkahînekî me û ezmanan
ve derbas bûye heye, em muku-

---

1 Yên nexwestin ku bawer bikin.
2 Xwedê.
3 Ji me re jî hate mizgînî kirin.
4 An jî: Aramiya min, Zebûr 95:11
5 (1.Mûsa 2:2)
6 Vebuhtin, diyarkirin, xuyakirin.
7 Hişk mekin, Zebûr 95:7-8
8 Bitesîr e.

riya xwe[1] bi zexmî ve bigirin!
15 Ji ber, Serokkahînekî me, yê
ku ji aliyê hêsan ve nikarî beşdarî
lawaziyên me bibe nîne, lê yê di
her tiştî de mîna me hatiye ceri-
bandin, lê belê bê guneh e heye.
16 Niha bona ku em bigihêjin di-
lovaniyê û bona em xêrê bibînin,
ji bo ku di wextê de alîkariya wê
bibe, em bi metirsiyê nêzîkî texta
xêrê bibin!

5 Ji ber ku, ji bona gunehan di-
yarî û qurbanan pêşkêş bike,
her Serokkahîn ji mirovan ve tête
stendin û di tiştên aidî Xwedê
de bona mirovan tête tayîn kirin.
2 Dikare bi nezan û bi yên ji rê ve
derketine, bi nermî têkiliyê dey-
ne; ji ber ku ew bi xwe jî bi lawa-
ziyê ve hatiye girtin 3 û ji ber vê
yekê çawa ku bona gunehên gel,
bi qurbandanê ve deyndar e, bona
gunehên xwe jî deyndar e. 4 Û
mirov vê rûmetê[2] ne xwe bi xwe
ve, lê mîna Harûn, dema ji aliyê
Xwedê ve bête bang kirin distîne.
5 Bi vî awayî, Mesîh jî bona bibe
Serokkahîn, xwe bi xwe bilind
nekir, lê belê kesê ku ji wî re got:
Tu Lawê minî, îroj ez ji te re bûm
Bav, wî bilind kir[3]; 6 çawa ku, di
derekê din de jî dibêje:
Tu li gor sazûmana Melkîsedek,
heta bêdawîbûnê kahîn e[4].
7 Mesîh di rojên bedena xwe de,
ji yê ku di hêza wî ji mirinê ve bi-
karibe xelas bike de ye bi qêrîn,
feryad û hêstirên çavan ve dua û
lavayan kiriye û ji berya Xwe-
dêtirsîna[5] xwe hatibû bihîstin
8 û ew çawa ku Law bû jî, lê ji
keserên ku kişandine, hînî îtaetê
bû 9 û gava ew hate rayedar kirin
û ji aliyê Xwedê ve li gor sazûma-
na Melkîsedek, bi Serokkahîn-
tiyê ve hatiye wezîfedar kirin,
10 bona hemû kesên ji wî re îtaet
kirine, bûye çavkaniya xelasiya
abadîn.
11 Di derheqê vê de gellek go-
tinên me yî em bibêjin hene û ji
ber, êdî guhên we di bihîstinê de
giran bûne, şîrova wê dijwar e.
12 Ji ber, çawa hûn deyndar bûn
ku heta niha bibûna mamoste, lê
dîsa hewceya we heye ku yekî
destpêka hêmanên peyxamên
Xwedê ji nû ve hînî we bike û hûn
ne yên ku motajiya xwarina zexm[6],
lê bûne yên ku motajiya wan ji şîr
ve heye! 13 Ji ber, her kesê ku bi
şîr ve tê xwedîbûn pitik in û di
gotina rastiyê de bê ceribandin
in[7]. 14 Lê belê xwarina hişk bona
gîhaştiyan, yanê, bona kesên seh-

1 Îqrara xwe.
2 Xawên, şeref.
3 Zebûr 2:7
4 Zebûr 110:4
5 Teqwayê.
6 Xwarina hişk.
7 An jî: Bêtecrube ne.

kirinên wan bi ceribandinan ve bi perwerdebûnê ve hînî veqetandina qenc û xerabiyê bûne ne.

*Îkazên bona ji baweriyê ve vegerîn*
1.Tîm 6,12; Rom 4,13-25

6 Bo vê yekê, em bi berdana
perwerde kirina pêşîn, ya di
derheqê Mesîh de, berbi kamiliyê
ve pêş ve biçin û dîsa ji karên mirî
ve, em bingeha tobê, ji Xwedê
ve bawerkirinê, 2 perwerde ki-
rina vaftîzan û danîna destan[1] û
vejîna miriyan û daraziya bêdawî
nevêjin. 3 Û ger Xwedê destûrê
bide, em ê vêya çêbikin.
4 Ji ber, bêîmkan e ku, mirov yên
carekî hatine ronahî kirin, xelata
ezmanî tahm kirine û bi Ruhê Pîroz
ve hatine şirîk kirin 5 û qenciya
gotina Xwedê û qudretên dema bê
tahm kirine, 6 lê ji rê ve derketine,
dîsa bîne rewşa tobe kirinê; ji ber
ku ew dîsa Lawê Xwedê ji bo xwe
li xaçê dixin û riswa dikin! 7 Ji ber
ku Xwedê zeviyên tim û tim barana
ku bi ser ve dibarî vedixwe û bona
kê tê çandin, zadên qenc dide wan,
bi bereket dike; 8 lê belê gava ew
gîhayên bi kelem û stirîmişk bide,
bêfêde ye, nêzîkî nalet lêanînê ye û
dawiya wê şewat e.
9 Lê belê xoşewîstno, çawa ku em
wusa dibêjin, lê dîsa em bawer in
ku rewşa we hîn jî qenc e û li gor
xelasiyê ye. 10 Ji ber ku Xwedê
ne bê dad e ku; keda we û xizmet
kirina we yî ji pîrozan re kiriye û
hîn jî hûn dikin û hezkirina ku we
ji navê wî re daye xuya kirin, ji bîr
bike[2]. 11 Û em dixwazin ku, bona
hûn bigihêjin bitûniya ewledariya
ku hêviya we dide, her yekî ji we
bila eynî xîretê bide; 12 da ku, hûn
teral nebin, lê belê li gor wekoka
yên wad kirinan bi bawerî û sebrê
ve mêras girtine, bikin.

*Wada Xwedê*

13 Ji ber ku dema Xwedê ji Bi-
rahîm re wadê kir, bona ku li ser
mafê yekî hîn mezin nikarîbû
sondê bixwe, li ser navê xwe sond
xwar û got:
14 Bi rastî ez ê bi zêdeyî te pîroz
bikim û ez ê nîjada te, zehf zêde
bikim[3]!
15 Û bi vî awayî, bi sebir kirinê
gîhaşt wadê.
16 Ji ber ku, mirov bona mafê
yekî hîn jî mezintir sondê dixwin
û li cem wan sond, tiştên tê gotin
rast dike û hemû munaqeşeyan
diqedîne ye. 17 Xwedê xwest ku
neguhertina armanca wada xwe
hîn jî bi eşkeretî xuyayî mêras-
kerên wadê bide, wada xwe bi
sondekê zeximand; 18 da ku, em,

---

1 Dest danîna ser.
2 An jî: Ji ber, Xwedê ne bê dad e ku; karê we û hezkirina we ya we bi ji pîrozan re xizmet kirinê û bi kirina xwe, bona navê wî dane xuya kirin, ji bîr bike.
3 (1:Mûsa 22:16-17)

yên ku bona girtina hêviyê, ya li
ber me hatiye danîn ve xwe spar-
tinê, bi navgîniya van her du tiştên
ku di wan de derew gotina Xwedê
bêîmkan e û nayên guhertin, bibin
xwediyê xemrevînek xwurt. 19 Ev
hêviya me, mîna hesinê keştiya
can zexm û ewle ye, derbasî ali-
yê dinî perdê, ya hundir dibe;
20 Îsa li gor sazûmana Melkîse-
dek, abadîn bû Serokkahîn û bona
me bi pêşengî derbasî wê derê bû.

*Serokkahîntiya sereta Melkîsedek*
1.Mûs 14,17-20

7 Ji ber ku ev Melkîsedek, qiralê
Salemê û kahînê Xwedayê bi-
lind bû; ji pêşwaziya Birahîmê ji
bindestkirin û xerakirina qiralan
ve vedigeriya re derketibû û wî
pîroz kiribû 2 û yê ku Birahîm
jî dehekê her tiştî da wî; li gor
wateya navê xwe, pêşiyê: Qiralê
dadmendiyê ye, pişt re jî: Qiralê
Salemê, yanê: Qiralê xweşiyê[1] ye.
3 Ew bê bav, bê dayik, bê nîjad
e; di wî de, ne destpêka rojan û
ne jî dawiya jiyanê heye; lê belê
bi mîna Lawê Xwedê ve kirinê,
li ser domahiyê bi kahînbûnê ve
bimîne.
4 Niha li vî zilamî binihêrin; çiqas
mezin e bibînin; bapîrê mezin Bi-
rahîm jî, ji xenîmetê dehekê daye
wî! 5 Û li gor zagonê, kesên ji nî-
jada Lêwî bin û wezîfeya kahîn-
tiyê bigirin, ji gel, yanê, ji nîjada
Birahîm ve jî bin, emir hate dayîn
ku dikarin ji birayên xwe ve de-
hekê bistînin; 6 lê belê yê ku nîja-
da wî ji wan nehatiye hesibandin,
ji Birahîm ve dehekê girtiye û ji
kesê ku wad jê re bûn re, dua xêrê
kiriye[2]! 7 Û îtiraz lê nayê kirin ku,
piroz kirin[3] ji aliyê yê hîn mezin
ve ji yê hîn biçûk re tê kirin. 8 Û li
vir, kesên fanî dehekê distînin; lê
belê li wir, yekî ku li jîndariya wî
şahdeyî tê kirin distîne. 9 Û dika-
re bête gotin ku, Lêwiyê dehekê
distend jî bi navgîniya Birahîm
ve, ji dehan yekî daye; 10 ji ber
ku Melkîsedek dema pêşwaziya
wî kir, ew hîn di bedena bapîrê
xwe de bû.

*Sazûmana Serokkahîntiyê ya nû*
Zeb 110,4; Îbr 8; 9,6-12; 10,10-14

11 Niha ger bi navgîniya kahînê
Lêwiyî bikaribana bigîhiştina
rayedariyê – ji ber ku gel li binya
vê kahîntiyê gîhaşt zagonê – êdî çi
hewce hebû ku ne li gor sazûmana
Harûn, li gor sazûmana Melkîsedek
kahînek din bê? 12 Ji ber ku, dema
kahîntî têguherîn, hewceyî dibe ku
zagon jî bê guhertinê. 13 Ji ber ku
yê bi vî awayî di derheqê wî de tê

---

1 Aştiyê, silametê.
2 Pîroz kiriye.
3 Dua xêrê, an jî: Dua pîrozkirinê.

duwemîn çadira ku navê wê Cîhê
Herî Pîroz e hebû 4 û di wê de
pêşkêşîgeha buxurê ya zêrînî û
Sindoqa Peymanê ya ji her alî ve
bi zêr ve bitamdayî hebû; di nava
wê de şerbikê mannê[1] ya bi zêran
ve hatiye çêkirin, gopalê Harûn
ya şiv dayî û lewheyên peymanê
hebûn 5 û kerûbiyên bilindahiyê
yên ku li kefaretgehê sîh dikirin
li ser wê disekinîn; lê niha di der-
heqê wan de bi cudayî gotin ne
mimkun e[2].
6 Û her tişt bi vî awayî hate sa-
zûman kirin pê ve, kahînan her
tim dikevin birra pêşîn ya çadirê
û wezîfa peristina xwe tînin cîh;
7 lê belê tenê Serokkahîn di salê
de carekê dikare têkeve ya du-
wemîn; di ser de bêyî xwîna qur-
bana ya bona xwe û bona sûcên
gel ji nezaniyê kirine pêşkêş kiri-
ye nikare têkeve. 8 Bi vêya, Ruhê
Pîroz dide xuya kirin ku, heta ku
çadira yekemîn bisekine, rêya
cîhê pîroz hîn nehatiye xuya kirin.
9 Vêya, bona dema niha mînakek
e; li gor vêya qurban û diyariyên
ku ûcdanê yê peristinê dike nika-
rin bigihînin kamiliyê têne pêşkêş
kirin; 10 bi xwarin, vexwarin û bi
tewr tewrî şuştinan ve û qaîdeyên
cismanî, yên tenê heta wexta is-
lehkirinê hatine danîn bûn.

*Xwîna Mesîh bingeha xelasiya abadîn e*

Îbr 10,11-22; 12,24; 2.Mûs 24,3-8; 3.Mûs 17,11; Îbr 10,4

11 Lê belê Mesîh, bi Serokkahîntî
bûna tiştên qenc yên dê bên, der-
ket navendê; ji ya bi dest ve neha-
tiye çêkirin, yanê, ji çadira ne ji vê
afirandinê ye û hîn jî mezin û rew-
neqdar e derbas bû; 12 ne bi xwîna
nêrî û golikan, lê belê bi avakirina
xelasiya bêdawî, bi xwîna xwe
di yek carê de ji bo hemû caran
ket cîhê pîroz[3]. 13 Ji ber ku bona
paqijiya bedenî ya yên gemarî
bûne, ger xweliya nogin û xwîna
gamêş û nêriyan wan pîroz dike;
14 dê xwîna Mesîhê bi navgîniya
Ruhê abadîn, xwe bi bêleketiyê
pêşkêşî Xwedê kiriye, bona hûn ji
Xwedayê zindî re qûlitiyê bikin,
ûcdanê we ji karên mirî ve paqij
kirina wê çiqas biryar e!
15 Û bi vê sedemê, ew navberê
peymanek nû ye jî, da ku, wekî
bona fîdya sûcên ku di bin pey-
mana yekemîn de ne mirin pêk
hatibe, bila yên ku hatine dawet
kirin wada mêrasa abadîn bis-
tînin. 16 Ji ber ku li ku derê we-
siyetek hebe, divê mirina wesi-
yetkir hatibe îspat kirin. 17 Ji ber
ku li ser mirinê wesiyet derbas
dibe; heta ku wesiyetkir bijî, tu

1 Manna, xwarina Xwedê, ya ji Îsraêliyên li çolê mane re ji ezmanan ve şandiye.

2 Teferrûatên.

3 Cara pêşîn û paşîn ket cîhê pîroz.

çalakiya wesiyetê tune. 18 Bi vê
sedemê peymana yekemîn jî heta
ku xwîn nehat rijandin, neket der-
basbûnê. 19 Ji ber ku Mûsa, paşî
her yek emirên li gor zagonê tê-
gihand hemûya gel, bi hiriyê sor,
gihayê zûfayê û bi avê ve xwîna
nêrî û golikan girt û him li ser pir-
tûkê, him jî li ser hemûya gel ve
reşand 20 û got: Xwîna peyma-
na ku Xwedê dixwaze hûn li pey
herin ev e[1]! 21 Mîna vêya li ser
çadir û hemû tiştên di peristinê de
tên şuxulandin jî xwînê reşand.
22 Û li gor zagonê, hema her tişt
bi xwînê ve tên paqij kirin û bê
xwîn rijandinê bexşandin nabe.
23 Niha, hewce kir ku, mînaka
tiştên ku li ezmanan e bi vana, lê
belê bi xwe yên ezmanî, bi qur-
banên hîn jî qenc bête paqij ki-
rin. 24 Ji ber ku Mesîh, ne ji bo
mînakiya yê rasteqîn, cîhê pîrozê
bi dest ve hatiye çêkirin, lê belê
bona ji bo me di hizûra Xwedê de
xuyanî bibe, bi xwe ket ezman;
25 wekî ku Serokkahîn ji salê heta
salê, bi xwînekî ne ya xwe dike-
ve Cîhê Herî Pîroz, ne bona xwe
gellek caran pêşkêş bike ye jî;
26 ya na hewce dikir ku wî ji ava-
kirina dinê ve gellek caran keserê
bikişanda; lê belê niha, ew carekê
bona betaliya gunehê, di dawiya
deman de bi qurban kirina xwe
ve hatiye xuya bûn. 27 Û carekê
mirin û paşî wê daraz bûn çawa
qedera mirovan e, 28 bi vî awayî,
Mesîh jî bona gunehê gellekan li
xwe bar bike carekê hate qurban
kirin; cara duwemîn, ne ji bona
gunehan[2], lê bona yên li benda wî
ne xelas bike dê xuyayî wan bibe.

*Îsa Mesîh, bi qurbanekî heta bêdawiyê derbas dibe xelasiyek abadîn anî*

Zeb 4,7-9; Îbr 9,7-15; 9,23-28

10 Ji ber ku, zagon ne bi xwe-
dîtiya sûretê esil ya tiştên
qenc, yên ku dê werin, bi xwe-
dîbûna siya wê, tu carî yên ku bi
qurbanên wekhev yên ji salê heta
salê bidome, pêşkêş dikin, nêzîk
dibin, nagihîne gehîştinê. 2 Ya na,
dê dawî nedana pêşkêşiyê qurba-
nan? Ji ber ku yên peristinê dikin,
carekê ji gunehên xwe ve bên
paqij kirinê pê ve, êdî haya gune-
han bi wan re nedima. 3 Lê belê ji
salê heta salê, di wan qurbanan de
bîranîna gunehan dibe. 4 Ji ber ku
xwîna ganêr û nêriyan, gunehan ji
navendê ve ranakin. 5 Bona vêya,
dema ew tê dinê, dibêje:
Te qurban û pêşkêşî nexwest, lê belê
te ji min re bedenek amade kir.
6 Tu ji qewlên tên şewitandin û
ji qurbanên bona gunehan ve tên
pêşkêşkirin xoşnûd nebû.

1 (2.Mûsa 24:8)

2 An jî: Bêguneh.

7 Wê çaxê min got: – Di toma-
ra kitêbê de ji bona min hatiye
nivîsandin –; bona ku viyana
te[1]çêbikim, ya Xwedê, a vay, ez
hatim[2]!
8 Wî ji jor: Te qurbanan, pêşkêşiyên
qewlên tên şewitandin û qurbanên,
bona gunehan ve tên pêşkêş kirin
nexwest û tu ji wan xoşnûd nebû;
– yên ku li gor zagonê tên pêşkêş
kirin –, gote pê ve, 9 wê gavê: Bona
ku viyana[3] te çêbikim, ya Xwedê,
a vay, ez hatim got. Ew bona ku
ya duwemîn derbasbûyî deyne, ya
yekemîn radike. 10 Di yek carekê
de ji bo hemû caran bi pêşkêşî kiri-
na bedena Îsa Mesîh ve, em di wê
viyanê[4] de hatin pîroz kirin.
11 Û her kahîn roj bi roj, li ser lin-
ga disekine û wezîfa xwe dike û
eynî qurbanên ku tu carî nikarin
gunehan ji navendê rakin, dîsa û
dîsa pêşkêş dike; 12 lê belê wî
bona gunehan, qurbanekî heta bê-
dawiyê derbas dibe pêşkêş kir pê
ve, 13 ji wê demê ve heta neyarên
wî ji bin lingên wî re mîna pêlikê
bêne raxistin sekiniye û abadîn li
aliyê rastê Xwedê rûniştiye. 14 Ji
ber ku yên hatine pîroz kirin, bi
pêşkêşiyekî heta bêdawiyê gîhan-
diye kamiliyê. 15 Û Ruhê Pîroz jî
di vê babetê de şahdeyiyê ji me
re dike; ji ber ku pêşiyê dibêje:
16 Xudan dibêje: Paşî wan rojan
peymana ku ez bi wan re bibirim
ev e: Ez ê zagonên xwe têxim
dilên wan û ez ê vana li hişên wan
binivîsînim.
17 Pişt re jî dibêje: Êdî ez ê gu-
neh û sûcên wan di bîra xwe de
neynim[5].
18 Niha di rewşa efûbûna vana de,
êdî bo guneh hewceyî ji pêşkêşiyê
re nîne.

*Bi cesaretê ve bikevin cîhê pîroz*

Îbr 4,1-11; 4,14-16; Îbr 6

19 Niha, ya birano, bi xwîna Îsa
ve, ji perdê, yanê, ji rêya nû û
zindî, ya ku ji bedena xwe ve ji
me re tirxan kiriye, wekî cesareta
me hebe ku em têkevin cîhê pîroz
20 û çawa ku li ser mala Xwe-
dê kahînek me yî mezin hebe,
21 wekî ku dilê me ji ûcdanê
xerab ve hatibe paqij kirin û be-
dena me bi ava paqij ve hatibe
şuştin, em bi tijîbûna baweriyê,
bi dilekî rasteqîn ve nêzîk bibin;
22 bêyî dudilî, bi awayekî şidandî,
bi mukurhatina hêviyê ve bigirin,
23 ji ber, yê ku wadê dike, dilsoz e
24 û mîna ku hinekan ji xwe re
kirine adet, em civînên xwe ne-
terekînin[6], lê belê her çiqas hûn
nêzîk bûyîna rojê dibînin, hev
û din ewqasî zêde teşwîq bikin,

1 Dawxaza te, îrada te.
2 Zebûr 40:6-8
3 Daxwaz, îrade.
4 Daxwaz, îrade.
5 Yêremya 31:33-34
6 Em dev ji civandin û hatina cem hev ve bernedin.

25 bona cehd kirina[1] hezkirin
û karên qenc em ji hev û din re
balkêş bin!
26 Ji ber, paşî ku em hînî qebûlki-
rina zanyariya rastiyê bûn, ger em
bizanîn guneh kirinê bidomînin,
bona gunehan êdî qurban namî-
ne; 27 lê li benda sekinîna bi tirs
ya darazbûnê û agirê sor yê dê
neyaran bixwe û biqedîne bimîne.
28 Kesekî zagona Mûsa bi valahiyê
hesibandiye, li ser gotinên du an jî
sê şahdeyan ve dê bêyî dilovaniyê
bimire. 29 Ger kesek, Lawê Xwedê
bigre bin lingan, xwîna peymanê
ya ku wî pîroz kiriye bêrêz bihe-
sibîne û heqaretê li Ruhê keremkar
bike, hûn dibêjin qey dê hîn liyaqî
cezayekî çiqas giran be? 30 Ji ber
ku em, yê: Tol ya min e, ez ê berdê-
la wê bidim[2] û dîsa: Dê Xudan gelê
xwe daraz bike dibêje[4], dinasin.
31 Bi dest ketina Xwedayê zindî,
tiştek bi tirs e!
32 Lê belê paşî ronahî bûnê, ro-
jên pêşîn yê ku, hûn ji aliyekî bi
gazinc û tengasiyê, ji temaşeyê
re hatibûn pêşkêş kirin, 33 ji ali-
yê din jî bi pardar bûna yên ku vê
muamelê dibînin ve, berxwedana
têkoşîna êşên mezin di bîra xwe
de bînin. 34 Ji ber ku hûn him bûn
şirîkê derdên yên girtîgehê[4], him
jî bi zanîna malik we yî hîn jî qenc
û mayînî heye, bi kêfxweşiyê li
talan kirina malên xwe nihêr-
tin. 35 Niha metirsiya xwe yî ku
xelata wê ya mezin heye, ji xwe
nevêjin! 36 Ji ber, paşî ku hûn
viyana[5] Xwedê bînin cîh, bona
gîhaştina wadê, hewceya we ji
sebrê ve heye. 37 Ji ber ku êdî: Yê
dê bê, dê di herî nêzîk de bê û dê
dereng nemîne.
38 Lê belê dê yê salih[6], bi ba-
weriyê ve bijî û ger ew paş ve
vekişe, dê canê min ji wî razî
nebe[7].
39 Lê belê em ne ji yên paş ve
vedikişin û helaq dibin in; lê yên ji
bo xelasiya can baweriyê aniye ne.

*Bawerî û şahdeyên Peymana Kevin*

Rom 4,17-22; 1.Yû 5,4-5

11 Niha bawerî, bi tiştên ku ji
wan hêvî têne kirin ewle-
bûn, ji tiştên ku nayên xuyanî kirin
re qinyat e. 2 Ji ber ku ji mirovên
demên kevn re[8] bi vêya şahdeyî
hate kirin. 3 Bi baweriyê ve em
fêhm dikin ku, kaînat bi gotina[9]
Xwedê ve hatiye afirandin; ûsa
ku, tiştên xuya dibin, ji yên dît-
bar[10] ve çênebûn.

---

1 Xiret kirin, kiş kirin.
2 (5.Mûsa 32:35)
3 (5.Mûsa 32:36)
4 An jî: Hûn tevî min bûn şirîkê zincîrên min.
5 Daxwaz, îrade.
6 Salihê min.
7 Habaqûq 2:3-4
8 An jî: Bi emirê Xwedê.
9 An jî: Bi emirê Xwedê.
10 Xuyang.

*Habîl, Henox û Nûh*

4 Bi baweriyê ve Habîl, qurbane-
kî ji ya Kayîn ve qenctir pêşkêşî
Xwedê kir û di derheqê diyariyên
wî de Xwedê bi şahdeyî kirinê, bi
vî awayî ji salih bûna wî re şahde
bû û çawa ku ew miriye jî, bi vê
navgîniyê ve hîn jî dibêje.
5 Bi baweriyê ve Henox, bona
mirinê nebîne hate neqil kirin û
nehat dîtin; ji ber ku Xwedê wî
neqil kiribû; ji ber ku beri ne-
qilbûna wî, şahdeyî hate dayîn
ku, ew ji Xwedê re meqbûl e.
6 Lê belê bê bawerî, meqbûl bûn
bêîmkan e; ji ber yê ku nêzîkî
Xwedê bibe, divê bawerî bîne ku
ew heye û dê yên li wî digerin, bi
xelat bike.
7 Bi baweriyê ve dema Nûh, di
derheqê tiştên hîn nebûne de, ji
aliyê Xwedê ve hate îkaz kirin, bi
tirsa Xwedê[1] bona xelasiya mali-
yên xwe keştiyekî ava kir; bi vêya
dinê daraz kir û bû mêraskerê ras-
tiya xwe spartiye baweriyê.

*Rêya baweriya Birahîm*

8 Bi baweriyê ve Birahîm dema
bona cîhê ku bi mêrasî bigire ji
wî re hate bang kirin, îtaet kir û
bêzanîna dê here ku derê, derket
rê. 9 Li warê ku bi baweriyê ve ha-
tiye wad kirin, tevî Îshaq û Aqûp
yên hemmêraskerên eynî wadê
ne re, wekî li warekî biyan be,
di çadiran de rûnişt û bû mêvan;
10 ji ber, ew li benda bajarê ku bi
bingeh, yê ku mîmar[2] û çêkirê wê
Xwedê ye, bû.
11 Bi baweriyê ve Sara bi xwe jî
ji ber ya hatiye wad kirin, ewledar
hesibandibû, bi stewrbûn û temen
derbasbûna xwe jî, bona ducanî
manê ve hêz dît. 12 Ji ber vê yekê,
ji zilamekî tenê, di ser de, ji yekî
ji miriyan ve ne cihê ye, bi hej-
marî qasî stêrkên ezmanan û mîna
qûma li qeraxa behrê wertên[3] bê
hejmar çê bûn.

*Bawermend di dinê de mêvan in*

13 Hemûyên wan kesan di ba-
weriyê de mirin û negihîştin yên
hatine wad kirin, lê belê wan ji
dûr ve dîtine û silav danê û li rûyê
erdê xerîb û mêvan bûna xwe bi
eşkeretî qebûl kirin. 14 Ji ber ku
yê ûsa diaxifin, xuya dikin ku, li
welatekî digerin. 15 Û bi rastî,
ger cîhê ku ji wê derketine bifiki-
riyana, dê bona vegerê fersenda
wan hebûya. 16 Lê belê ew niha
ya hîn jî qenc, yanê, ya ezmanî
dixwazin; ji ber vê yekê Xwedê,
bi bîranîna, Xwedayê wan bûna
xwe şerm nake; ji ber ku bajarekî
ji wan re amade kiriye.

1 Teqwayê.
2 Qesirbend.
3 Neviyên, zuret.

*Baweriya Birahîm, Îshaq, Aqûp û Ûsiv*

17 Bi baweriyê ve Birahîm, dema
ku hate ceribandin, Îshaq bi qur-
banî pêşkêş kir; yê ku wadan gir-
tiye, lawê xwe yî yekane qurban
bikira 18 û yê ku jê re hatibû go-
tin: Dê di Îshaq de nîjada te bête
bang kirin[1]. 19 Ew bi hesibandina,
Xwedê şiyandar e ku, heta ji miri-
yan jî bivejîne û bi nimînandinekê
jî wî ji wir şunda girt.
20 Bi baweriyê ve Îshaq, di der-
heqê tiştên dê bên de Aqûp û
Esav pîroz kirin. 21 Bi baweriyê
ve Aqûp, dema dê bimira, her du
lawên Ûsiv pîroz kirin û xwe da
serê çoyê xwe û secde kir[2]. 22 Bi
baweriyê ve Ûsiv, dema bimira,
derketina lawên Îsraêl di bîr de
anî û emirê di derheqê hestiyên
xwe de da[3].

*Rêya baweriya Mûsa*

23 Bi baweriyê ve dema Mûsa
hate dinê, ji aliyê dayik û bavê
xwe ve, sê mehî hate veşartin; ji
ber ku xweşikya lawik dîtin û ji
fermana qiral ve netirsîn. 24 Bi
baweriyê ve dema Mûsa mezin
bû, bi lawê qîza Fîrawûn bûnê ve
nasînê red kir. 25 Bi gelê Xwedê
re heqaretê dîtinê, ji demekî ajo-
tina kêfa gunehê ve çêtir dît. 26 Ji
bo Mesîh biçûk hatin dîtinê, dew-
lemendiyek ji xezîneyên Misirê
mezintir hesiband; ji ber ku ew
li xelata ku dê bistîne dinêriya.
27 Bi baweriyê ve ji hêrsa qiral
netirsiya, wî dev ji Misirê berda;
ji ber mîna kesê nayê dîtin, dibî-
ne, li berxwe da. 28 Bi baweriyê
ve wî Fisihê û reşandina xwînê
pêk anî, da ku, yê yên pêşîbûyînê
helaq dike, dest nede wan. 29 Bi
baweriyê ve ew[4] ji Behra Gewez[5],
mîna ji erdê ve derbas dibin, der-
bas bûn; dema Misiriyan vêya ce-
ribandin, xeniqîn.

*Baweriya Rehaba fahîşe*

30 Bi baweriyê ve piştî ku heft roj
dor lê hate zivirîn, sûrên Erîhayê
ketin. 31 Bi baweriyê ve ji ber
ku Rehaba fahîşe, casûsan[6] bi
xweşiyê ve qebûl kiribû, bi bêba-
weran[7] re helaq nebû.

*Bawermendên Îsraêlî*

32 Û hîn ez çi bibêjim? Ji ber
ku ger ez di derheqê Gîdeyon,
Barak, Şîmşon, Yêftah, Dawid
û Samûyêl û peyxamberan de
bibêjim, dê wexta min têra wê
neke. 33 Bi baweriyê ve wan
welatan feteh kirin, dadiyê ava

---

1 (1.Mûsa 21:12)
2 Ji Xwedê re perestî.
3 Yanê xwest ku dema di derketinê de bila hestiyê wî jî bi xwe re bibin.
4 Îsraêliyan.
5 An jî: Sor.
6 Sîxûran.
7 Îtaetnekiran.

kirin, gîhaştin tiştên hatine wad
kirin, devê şêran girtin; 34 hêza
agirê tefandin, ji devê şûr ve re-
viyan; ji lawaziyê ve xwurt bûn,
di şer de dijwar bûn, artêşên bi-
yan dan revandin[1]. 35 Pîrekan,
miriyên xwe bi navgîniya vejînê
ve paş ve stendin û hinekan jî ber-
dan qebûl nekirin, bi hêviya vejî-
nek hîn jî qenctir lêdanan dîtin;
36 hin kesên din jî rastî qerfan ha-
tin û hatin qamçî kirin, heta hatin bi
zincîr kirin û girtin; 37 hatin kevir
kirin[2], bi birekê ve hatin jêkirin,
hatin ceribandin û ji şûr ve hatin
derbas kirin û hatin kuştin; di nava
postê mîhan û çermê bizinan de
geriyan, xizaniyê kişandin, rastî
tengasiyan hatin, muamela xerab
dîtin; 38 dinya ne liyaqî wan bû;
li çolan û çiyayan û di şikeftan û
çalên bin erdê de geriyan û man.
39 Û hemûyên wan, çawa ku bi
navgîniya baweriyê ve şahdeyî
stendibûn jî, negîhaştin wadê; 40 ji
ber ku bona xeynî me, ew negihêjin
kamiliyê, Xwedê di derheqê me de
tiştekî hîn jî qenc amade kiriye.

*Di meşa baweriyê de li Îsa binihêrin*

1.Kor 9,24-27; Fîl 3,11-14; 1.Pêt 2,21-24

12 Niha ji ber ku ewrê
şahdeyan, ya ewqasî mezin
dor li me girtine, em jî her girani-
yê û gunehê ku bi hêsanî dor li me
pêçaye[1] berdin û li Îsayê ku destpê-
kirê[4] baweriyê û temamkirê wê ye
binihêrin û bazdana ku danîne ber
me bisebr baz bidin; 2 ew, di oxra
kêfxweşiya ku danîne ber wî de
şermezariyê bi tiştekî nehesiband
û tehemûlî xaçê kir[5] û li aliyê rastê
yê texta Xwedê rûnişt. 3 Niha bona
ku hûn di canê xwe de biwestinê
ve metirsiya xwe winda nekin, yê
li dijî ev qas dijraberiya gunehka-
ran li ber xwe daye bifikirin!

*Xudan, hezkirên xwe perwerde dike*

M.Sil 3,11-12; Pey 3,19; Zeb 119,71;
Aqûp 1,2-4

4 Di şerê li dijî gunehan de we
hîn heta ku xwîn birije, di berxwe
nedan 5 û we vê şîreta, mîna ji la-
wan re bête gotin, ji we re hatiye
gotin ji bîr kirin:
Ya lawê min, perwerde kirina Xu-
dan biçûk nebîne û dema tu ji aliyê
wî ve bête azirandin, sist nebe[6]!
6 Ji ber ku Xudan, bi hezkirê xwe
ve dipeke û li her lawê ku qebûl
kiriye ve dixe[7].
7 Hûn bona perwerdebûnê sebir
dikin; Xwedê mîna lawan mua-
melê li we dike; ji ber, ma kîjan
law heye ku, bavê wî, wî perwerde

---

1 Xera kirin.
2 Recimandin.
3 An jî: Bi me girtiye.
4 Pêşeng, pêşdar.
5 Ji mirina ser xaçê re razî bû.
6 Metirsiya xwe winda neke!
7 M.Silêman 3:11-12

nake? 8 Lê belê ger hûn bêyî per-
werdebûna ku her kes dibîne bin,
hûn ne law, ewladên dervî zagonê
ne[1]! 9 Xeynî vê yekê, bavên me yî
dinyewî yên me perwerde dikirin
jî hebûn û me hurmetê ji wan re
dikirin; gelo hewce nake ku em
hîn jî bi zêdeyî ji Bavê ruhan re bi
îtaet kirinê ve bijîn? 10 Ji ber ku
wan, mîna li cîh didîtin, di demekî
kurt de me perwerde dikirin; lê
belê ew, bona ku em bibin şirîkên
pîroziya wî, me bo qencîtiya me
perwerde dike. 11 Her perwerde-
bûn, pêşiyê şêrîn nayê, tahl tê; lê
belê ev dawiyê bona yên tên per-
werde kirin, rastiya ku dilxweşiyê
dide ava dike. 12 Bona vêya des-
tên pançilmî rakin, çongên xwar
rast bikin, 13 bona lingên xwe
rêyên rast çêkin; da ku, bila yê
kûd ji rê ve dernekeve, lê belê hîn
jî zêde şifê bibîne!

*Xwedê red mekin*

Îbr 3,7-16

14 Tevî her kesî li pey aştî û pîro-
ziya ku tu kes bêyî wê nikare Xu-
dan bibîne ve baz din! 15 Bala xwe
bidin ku bila tu kes bê xêra Xwedê
nemînin; bila di hundirê we de re-
hek tahl ya we bê aram bike û bi
vêya ve gellek kesan gemarî bike,
şiv nede; 16 bila nebe zilamekî bê
teqwa, yê zînekar, an jî mîna Esa-
vê ku mafê lawê pêşiyê bûyînê
bi berdêla xwarinekê firotiye.
17 Ji ber, hûn dizanin ku, wî da-
wiyê xwest mafê pîrozahiyê şunda
bistîne jî, hate red kirin; ji ber ku
bi hêstirên çavan li wê geriya jî, wî
bona tobê îmkan nedît[2].
18 Ji ber ku hûn nêzîkî çiyayê dika-
re destpêkeve û bi agir ve dişewite
û tarî, tariya kûr û bahozê 19 û bi
gurmîna borîjena bangê û dengê
gotinan nebûn; yên wî dengî bihîs-
tin, bona gotinekî din ji wan re
neyê gotin li ber geriyan; 20 ji ber
ku, wan nikarîbûn li ber emirê: Ger
heywanek jî xwe li çiyê bixe, dê
bête kevir kirin[3], tehemûl bikirana!
21 Û xuyabûnî ewqas tirsehêz bû
ku, Mûsa: Ez zehf ditirsim û dile-
rizim[4]! gotibû. 22 Lê belê hûn di
nava şahiyek cejnê de, nêzîkî Çi-
yayê Siyonê, bajarê Xwedayê zindî,
Orşelîma ezmanî û bi deh hezaran
milyaketan 23 û Civaka gelemperî,
ya yekembûyên ku li ezmanan ve
hatine qeyd kirin, Xwedayê da-
razkerê her kesî û ruhên kesên
salih yên gîhaştine rayedariyê û
24 Îsayê navdîtê peymana nû û
xwîna reşandinê ya ji xwîna Habîl
ve qenctir diaxife bûn.
25 Xwe biparêzin, yê ku dibêje
red mekin! Ji ber ku ger dema

1 Ne heq, pînc.
2 Rê nedît; nekariya ku nêta bavê xwe biguhere, an jî: Qirara ku hatiye stendin neguherand.
3 An jî: Recimandin, (2.Mûsa 19:12-13)
4 (5.Mûsa 9:19)

wan yê li rûyê erdê wan îkaz kir
red kirin, çawa nikarîbûn xelas
bibin, ger em wecê xwe ji yê ji
ezmanan ve dibêje bizivirînin,
em hîn jî zêde xelas nabin! 26 Wê
çaxê, dengê wî erdê lerizandibû;
lê belê niha, bi gotina: Carekî din,
tenê ne erdê, ez ê ezman jî bile-
rizînim[1]! soz daye. 27 Û gotina:
Êdî carekî din, dide xuya kirin
ku, dê yên dilerizin, wekî tiştên
ku hatine afirandin bin, bêne ra-
kirin; da ku, yên nalerizin bila
baqî bimînin. 28 Bo vê yekê wekî
serweriyek nalerize be, bila xêra
me hebe ku, em bi wê ve ji Xwe-
dê re qasî ku meqbûl be bi hur-
met û teqwayê ve peristinê bikin!
29 Ji ber ku Xwedayê me[2], agirek
dişewitîne û diqedîne ye.

*Şîretên dawîn*

13 Bila hezkirina biratiyê
daîm be! 2 Mêvanperweri-
yê ji bîr mekin; ji ber ku bi vêya,
hin kesî bi nezanî milyaketan ki-
rin mêvan. 3 Girtiyan, wekî ku
hûn bi wan re hatibin girêdan,
yên ku heqeretê dibînin, hûn bi
xwe jî, wekî yên ku di bedenê de
ne, di bîra xwe de bînin. 4 Di nava
giştikan de zewac, bila mûteber[3]
be û bila livîn bêleke be[4]; ji ber ku
dê Xwedê, kesên fuhûş û zînayê
dikin daraz bike! 5 Bila jiyana
we li dûrî hezkirina pera bibe;
bi tiştên hûn lê xwedî ne qinyatê
bikin; ji ber ku wî bi xwe got: Ez
te tu carî berhewa dernaxînim û tu
carî te bernadim[5]!
6 Bi vî awayî em bi dilawêrî[6]
dibêjin: Xudan alîkarê min e, ez
natirsim; ma mirov dikare çi bi
min bike?
7 Serokên xwe yî yên gotina
Xwedê têgîhandine we, di bîr
de bînin; li dawiya jiyana wan
binihêrin û baweriya wan ji xwe
re mînak bigirin! 8 Îsa Mesîh,
doh, îro û heta bêdawiyê eynî ye!
9 Bi hînkariyên cihê û xerîb, bi
der û dorê ve neherikin; ji ber ku
ji dil re, bi xêrê ve pêdandî mayîn
qenc e, ne bi xwarinê ve; yên ku
bi vana[7] mijûl bûn, tu qenciyê ne-
dîtin. 10 Pêşkêşiyek me heye ku,
heqê ji wê xwarina yên ji çadira
peristinê ve xizmetê dikin, tune
ye. 11 Ji ber, laşên heywanên ku
Serokkahîn xwîna wan, bona gu-
nehan dibe cîhê pîroz, li derveyî
artêşgehê ve tête şewitandin.
12 Bo vêya, Îsa jî bona bi xwî-
na xwe ve gel pîroz bike, li
derveyî deriyê ve êşan kişand.
13 Niha em jî, bi kişandina gazin-

1 Hagay 2:6
2 An jî: Xwedayê me jî.
3 Rêzdar, rewac.
4 An jî: Bila livîna zewacê bêleke be.
5 Yêşû 1:5
6 Bi cesaret.
7 Xwarinan.

cên[1] wî, ji artêşgehê ve derkevin
û herin cem wî! 14 Ji ber ku baja-
rek me yî mayînî li vir nîne, lê em
li ya ku dê were digerin[2].
15 Niha bi navgîniya wî, her tim
ji Xwedê re qurbanên pesnahiyê,
yanê, mêwa lêvên ku navê wî îq-
rar dikin[3] pêşkêş bikin! 16 Lê belê
qencî kirinê û ya bi we re ye bi
kesên din re par kirinê jî ji bîr me-
kin; ji ber ku Xwedê ji qurbanên
ûsa ve dilxweş dibe! 17 Li go-
tinên serokên xwe guhdarî bikin
û bengî wan bibin; ji ber, ew mîna
yên ku dê hisabê bidin, di oxra
canê we de notirvaniyê dikin; da
ku, bila ew vêya ne bi nalînê, ji
ber ku qenciya vêya ji we re nîne;
lê bila bi kêfxweşiyê çêkin!

*Xwestin û silav*

18 Bona me dua bikin! Ji ber, em
bawer in ku, em xwediyê ûcdane-
kî paqij in û ji her alî ve dixwazin
jiyanek qenc bidomînin. 19 Û ez
kirina vêya bi zêdeyî rica dikim,
da ku, ez hîn zû ji we re bême ve-
gerandin.
20 Lê belê Xwedayê dilxweşiyê,
yê ku, Xudanê me Îsa yê Şivanê
mezin yê mîhan e, bi xwîna pey-
mana bêdawî, ji mirinê ve şunda
anî; 21 bila bi navgîniya Îsa Mesîh
yê ku li cem xwe meqbûl e di me
de bike û bona ku di her tiştê qenc
de viyana xwe bi cîh ve bîne[4] we
bigehîne gehîştinê[5]. Bila ji wî re,
bi abadîna abadînan ve bilindahî
bibe! Amîn.
22 Lê belê ez ji we rica dikim,
birano, ji gotina şîretê re tehemûl
bikin; ji ber ku min bi kurtî ji we
re nivîsand. 23 Bizanibin ku bi-
rayê me Tîmotêyos hate berdan;
ger di van nêzîkan de bê, ez ê tevî
wî werim dîtina we[6]. 24 Ji hemû
serokên xwe re û ji hemû pîrozan
re silav bikin! Yên li Îtaliyayê ne,
silavê ji we re dikin! 25 Bila xêr[7]
bi we hemûyan re be! Amîn.

1 Riswa, xax.
2 An jî: Em li yê hatinê ye digerin.
3 Mukur tên.
4 Îrade, an daxwaza xwe bi cîh ve bîne, an jî: Ava bike.
5 Kemaliyê.
6 Ez ê tevî wî we bibînim.
7 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# NAMEYA AQÛP

## BAWERIYA LI GOR JIYANÊ

*Pêşgotin*

Ev name, nîşana baweriya di jiyanê de bê cîh e. Yê ku bi peyxama Xwedê Nameyê nivîsandiye Aqûp e. Dîroka nivîsandina wê di salên 50'yan de ye. Aqûp li Orşelîmê, pêşhatiyekî Civakê bû (binêrin K.Şa. 15:19-23). Name, xeynî bawerkirên li herêma Cihûstanê ve dijîn, bona hemî bawerkiran hate nivîsandin. Babeta wê yî bingehîn di birrên 1:27 û 2:26 de hatiye nivîsandin. Name bi wekokên ji xweza ve hatine standin, kevneşopên rast û qenc ve tijî ye. Ev nameya bi gellek şîretan ve tijî ye û ramana wê ev e ku; baweriya ne bi lêkerê be vala ye, bê çalak e.

Di vê nameyê de qala gunehan û efûkirina Xwedê dike. Ev gunehan; hezkirina peran, quretiya ku ji hebûnê ve tê (2:2-4), bi dinê re hevaltî (4:4-6), bêsebrî, giliya bi gotinan (5:7-11), bêxûyî û fesadî (3:1-12; 4:11,12) ne.

Name bangî mirovên hemdem dike: Di derheqê têkiliyên neqenc û tengaviyên rojane de dibêje. Vê nivîsa balkêş, mirov dikare bi vî awayî kurt bike:

1. Xisûsiyetên baweriya rastî birra 1
2. Xuyaniya baweriya ku ji ceribandinê ve derbas nebûyî birrên 3 û 4
3. Şîret, îkazî û perwerdeyî birra 5

*Xisûsiyetên baweriya rastî*

1 Aqûpê qûlê Xwedê û Xudan Îsa Mesîh, ji donzdeh eşîrên ku belavbûne re silav dike!

*Ceribandin û xapandin*

2 Birayên min, dema hûn bi ceribandinên tewr bi tewrî ve rû bi rû hatin, vê bi dilekî xweş ve pêşwazî bikin. 3 Ji ber hûn dizanin ku, ceribandina baweriya we, hêza berxwedanê diafirîne. 4 Û bila hêza berxwedanê jî bona ku hûn bibin kesên tu kêmasiyên wan tune ye û gihîştî û rayedar, bigihêje çalakiyek bê kêmasî.

5 Lê belê ger kêmasiya yekî ji we di zaniyariyê de hebe, bila ji Xwedayê ku bi comerdî û bêpekîn dide her kesî bixwaze û dê

jê re bê dayînê[1]. 6 Lê belê bila bê
şik û şubhe, bi baweriyê bixwaze;
ji ber ku mirovên şik û şubhê di-
bihîze, mîna pêlên behrê yê ba wê
dibe û dilerzîne ye. 7 Ji ber ku mi-
rovê di hemû rêyên xwe de bêqi-
rar û du dilî, 8 bila nebêje qey ez ê
ji Xudan tiştekî bistînim.
9 Lê belê bila birayê ketî bi bilin-
dahiya xwe ve pesnê xwe bide, yê
dewlemend jî bi kêmasiya xwe ve
pêsnê xwe bide. 10 Ji ber ku dê
mirovê dewlemend mîna çîçeka
çolê biçilmise û biçe. 11 Ji ber ku
roj bi germbûna xwe yî şewitîn
ve dihilê û gîha hişk dike û çîçe-
ka wê dikeve û xweşikiya dîtina
wê winda dibe; dê mirovê dewle-
mend jî mîna vêya di rêyên xwe
de tune bibe û biçe.
12 Xwezî li mirovê ku di ceriban-
dinê de di berxwe bide! Ji ber ku
dema bi serfirazî ji ceribandinê ve
derket, dê taca jiyanê ya ku Xu-
dan ji hezkirên xwe re wad kiriye
bistîne. 13 Ger kesek bê ceriban-
din, bila nebêje ku: Xwedê min
diceribîne. Ji ber, çawa ku Xwedê
bi xerabiyan nayê ceribandin, ew
bi xwe jî kesekî naceribîne; 14 lê
belê her kes bi azweriyên xwe yî
xerab ve diherikin û tên xapan-
din. 15 Pişt re arezû ducanî dibe
û gunehan dizê; guneh jî dema
digihêje mirinê tîne.
16 Ya birayên minî xoşewîst,
nexapin! 17 Her nahmeta qenc û
her xelâta bêkêmahî, ji Bavê Ro-
nahiyan, yê siya guhêrbarî û ve-
gerokînê di wî de nîne, ji jor ve tê.
18 Wî, bona ku em bibin mêwê
yekemîn yê afirên wî, me li gor
xwestina xwe bi kelama rastiyê
ve welidand[2].

*Guhdarkirê gotinê û tetbîqkirê wê*

Met 7,24-27; Lûq 6,46; 5.Mûs 8,1-6

19 Ya birayên minî xoşewîst, ji
ber vê yekê[3], bila her kes di guh-
darîkirinê de bi lez, di axaftinê de
hêdî û di hêrsbûnê de jî hêdî be;
20 ji ber ku hêrsa mirovan, rastiya
Xwedê ava nake! 21 Bo vê yekê
hemû pîsitiyê û hemû bermayiyên
xerabiyê bavêjin[4], gotina ku di
hundirê we de hatiye çandin û di
hêza xelas kirina canê we de ye,
bi dilnizmî qebûl bikin!
22 Û tenê bi mayîna bihîstina go-
tinê ve xwe bi xwe nexapînin, lê
belê bibin kiryarê[5] wê. 23 Ji ber
ku ger kesek, tenê bibe guhdar-
kirê gotinê û nebe tetbîqkirê wê,
mîna mirovên li mirêkê[6], li wecê
xwe yî xweza dinihêre ye; 24 ji
ber ku ew xwe dibîne û diçe û ka

---

1 An jî: Dê (Xwedê) bide wî.
2 Gîhandin jiyanê.
3 Hûn vêya dizanin, lê belê...
4 An jî: Pîsitiya bi her avayî û xerabiya ku belavî her alî bûye, ji ser xwe ve bavêjin...
5 Tetbîqkir, nerîtvan.
6 Eynikê.

mirovek çawa bû hema ji bîr dike.
25 Lê belê kesekî li zagona mu-
kemel[1], li zagona azadiyê binêre
û bidomîne, ne bihîstkerê jibîrker,
lê xebatkarê zîrek e, dê di karê
xwe de bextewar bibe.
26 Ger di nav we de kesek xwe
oldar[2] bihesibîne, lê belê nikaribe
zimanê xwe zeft bike, dilê xwe
dixapîne û oldariya wî vala ye.
27 Li ber Bav Xwedê, oldariya
paqij û bêleke, di tengasiyên wan
de serîdayîna bî û sêwiyan û xwe
ji dinê bêleke girtin e.

*Îkazên li dijî cihêtî kirinê*

3.Mûs 19,15; Gal 3,28

2 Birayên min, bi yên ku ji Xu-
danê me yê mezin Îsa Mesîh
re bawerî anîne, di nava mirovan
de cihêtiyê mekin! 2 Ji ber ku ger
mirovek di nava kincên qenc de
û bi gustîlkên zêr û mirovek di
nava kincên gemarî de bê cîhê ku
hûn lê dicivin 3 û hûn bi têkilî ji
mirovên kincê wî qenc re bibêjin:
Tu li vir, li cîhê qenc rûne! Û ji
yê xizan re jî: Tu li wir bisekine!
an jî: Li binya lingên min rûne!
bibêjin; 4 ma hûn ê nebin kesên
di nava hev de cihêtiyê kirine û
darazkirên nêt xerab? 5 Guhdarî
bikin, ya birayên minî xoşewîst:
Ma Xwedê li vê dinê xizanan
bona di baweriyê de dewlemend
bibin û bibin mêraskerê serweri-
ya wî ya ji hezkirên xwe re wad
kiriye, ne bijartî ye? 6 Lê belê
we yê xizan bêrûmet kir. Ma yên
mêtîngehiyê li we dikin, ne yên
dewlemend in? Û ma yên we
berbi dadgehan dibin, ne ew in?
7 Ma yên ku ji navê bilind yê li
ser we re hatiye bang kirin re ku-
fur dikin, ne ew in?
8 Ger hûn li gor nivîsa ku dibêje:
Ji cîranê xwe mîna xwe hez bike[3]!
Zagona Qiraletiyê bînin cîh, hûn
qenciyê dikin; 9 lê belê ger hûn
di nava mirovan de cihêtiyê bikin,
hûn ê guneh bikin; ji aliyê zagonê
ve, bi zagonê eciqandina xwe ve
hûn ê bisûc bên dîtin. 10 Ji ber
ku kesekî hemû gotinên zagonê
bîne cîh, lê belê tenê di nuxtikekê
de ji wê derkeve, li dijî hemû za-
gonê bi sûc dibe. 11 Ji ber, yê ku:
Divê tu zinê meke[4]! gotiye; divê
tu mekuje! jî gotiye. Niha, ger tu
zinê neke, lê belê bikuje, tuyê bibî
êrîşkirê zagonê. 12 Mîna kesên
ku dê bi navberiya zagona azadi-
yê ve bên daraz kirin, bi vî awayî
biaxifin û bi vî awayî bikin! 13 Ji
ber ku darazî, li hemberê kesên
dilovaniyê xuya nekiriye, bê di-
lovanî ye; dilovanî li dijî daraziyê
serdest tê.

---

1 Bêkêmasî, tûmandar.
2 Kesê ku di rêya Xwedê de dimeşe, bawermend.
3 (3:Mûsa 19:18)
4 (2.Mûsa 20:13-14; 5.Mûsa 5:17-18)

*Lêkerî û bawerî*

Gal 5,6; Aqûp 1,22-27; 1.Yû 2,3-6

14 Birayên min, ger kesek dema
lêkeriyên wî yên qenc tune be, bi-
bêje baweriya min heye, ev ji çi re
dibe? Ma baweriyek ûsa dikare wî
mirovî xelas bike? 15 Ger dema
birayek an jî xwuşkek tazî û bêyî
xwarina rojane be, 16 yekî ji we
jî ji wan re bibêje: Bi dilxweşiyê
biçin, ez dixwazim hûn germ û têr
bibin, lê belê ger hûn hewceyiyên
bedenê nedin wan, ev ji çi re dibe?
17 Bi vî awayî, bawerî jî, ger xe-
batên wê tune be, bi tena serê xwe
mirî ye.
18 Lê belê dê kesek bibêje ku:
Baweriya te heye û kirinên[1] min
hene; tu baweriya xwe bêyî kiri-
nan nîşanî min bide û ez ê bawe-
riya xwe bi kirinên xwe nîşanî te
bidim! 19 Tu bi yek bûna Xwe-
dê bawer î, tu qenc dikî! Cin jî
bawer dikin û dilerizin! 20 Lê
belê, ya mirovê vala, ma tu bona
bêyî lêkeriyê bawerî mirî[2] ye
nîşanê dixwazî? 21 Ma bavê me
Birahîm, lawê xwe Îshaq li ser
pêşkêşîgehê, bi pêşkêşî kirinê, ji
kirinên xwe ve salih nehat hesi-
bandin? 22 Tu dibînî ku, bawerî
tevî karên wî dixebitî û bawerî bi
kirinan ve çû serî[3]. 23 Û bi gotina:
Û bawerî bi Xwedê ve anî û jê re
pakbûyî[4] hate hesibandin, Nivîsa
Pîroz çû serî û jê re; hevalê Xwe-
dê, hate gotin. 24 Hûn dibînin ku
mirov tenê ne bi baweriyê, bi ki-
rinan salih tête hesibandin. 25 Û
mîna vê yekê, ma Rehaba fahîşe
jî, ji ber ku şandiyan qebûl kir û ji
rêyek din şand, bi kirinan ve salih
nehat hesibandin? 26 Ji ber çawa
ku beden, dema ruh tunebe mirî
ye, bi vî awayî bawerî jî dema ki-
rin tunebe mirî ye.

*Îkazên li dijî ziman*

M.Sil 10,19; 13,3; 18,21; Rom 3,13-14;
Met 15,18-20; 12,33-37

3 Birayên min, bi zanîna em ê
rastî daraziyek hîn jî mezin
werin, bila gellekên we nebin
mamoste! 2 Ji ber ku em hemû
gellek xeta dikin. Ger kesek bi
gotinên xwe qet xeta meke, ew
mirovek kamil[5] e; bi hemû be-
dena xwe jî dikare. 3 Bona ku ji
me re îtaet bikin em hefsaran[6] li
devê hespan dixin, bi vî awayî em
hemû bedenên wan jî vedigerînin.
4 A vay, keştî jî ewqas mezin û
bi ber bayên bi hêz ve diherikin,
lê belê dîsa jî dimenger, dilê wî
kîjan alî ve bixwaze bi dimenek
biçûk, bi wî alî ve tên vegerandin.
5 Bi vî awayî, ziman jî endamekî
bedenê ya biçûk e û bi karên me-

---

1 Xebatên min.
2 Bêfêde.
3 Temam bû.
4 Başbûn, rastî, qencî, an jî: Dadiya Xwedê.
5 Gihîştî.
6 An jî: Lixaban.

zin ve pesnahiya xwe dike. A vay,
pizotek biçûk dikare daristanek
çiqas mezin biagir bixe! 6 Û zi-
man agirek, di nava endamên be-
denê me de dinyayek xerabiyê ye;
hemûya hebûna me gemarî dike.
Bi ji cehenemê agirbûna xwe ve
çûna jiyana me biagir dixe. 7 Ji
ber ku her tewr heywanê hov û
civîkan, xişok[1] û afirên behrê ji
aliyê mirovan ve hatine kedî kirin
û tên kedî kirin; 8 lê belê tu mirov
nikare ziman kedî bike; ew, xera-
biyek bêsekin û bi jahrekî dikuje
ve tijî ye! 9 Em bi wê ve pesna
Xudan û Bav didin û em bi wê ve,
ji mirovên di mînakiya Xwedê de
hatine afirandin re naletê[2] dikin;
10 pesnahî û kufir ji eynî devî ve
derdikevin. Birayên min, divê ev
ûsa nebe! 11 Ma kaniyek ji eynî
çavî ava şêrîn û tahl diherikîne?
12 Birayên min, ma dara hêjîrê
dikare zeytûnê, an jî mêwa tirî
dikare hêjîrê bide? Çavkaniya ava
bi xwê jî ava şêrîn nade.

*Zaniyariya ji ezmanan û ya ji dinê*

Ef 4,1-3; 1.Kor 3,3; 1.Pêt 3,8-12

13 Ma di nava we de yê zaniyar û
fêhmdar kî ye? Bila bi jiyana xwe
yî qenc û bi dilnizmiya ji zaniyari-
yê ve tê lêkerên xwe yî qenc xuya
bike! 14 Lê belê ger di dilê we
de çavnebarî û komperestî[3] hebe,
pesnê xwe nedin û li dijî rastiyê
derewan mekin! 15 Zaniyariyekî
ûsa ne ya ji ezmanan ve daketiye,
lê belê zaniyariyekî ji dinê, ji eziti-
yê û ji cinan ve hatiye yî. 16 Ji ber,
li ku derê çavnebarî û komperestî
hebe, li wir tevlihevî û xerabiya
her tewrî heye. 17 Lê belê zani-
yariya ku ji jor ve daketiye, berî
her tiştî pak e, pişt re aştîxwaz,
mulayîm, bi dilovanî û mêwên
qenc ve tijî ye; bê îltimas û bê
durûyitî ye. 18 Û avakirê aşitiyê,
yên di dema aşitiyê de diçînin,
dexla rastiyê radikin[4].

*Li dijî hevaltiya bi dinê re*

Gal 5,24-26; 6,14; 1.Yû 2,15-17

4 Ma çavkaniya keftûleft û şerê
di nava we de ji ku ve tên? Ma
ne ji azweriyên we yî di endamên
bedenên we de şer dikin in? 2 Hûn
dixwazin û bi dest naxinin. Hûn
dikujin û çavnebaritiyê dikin û na-
gihêjin xwestekê xwe; keftûleftê
dikin û şer dikin; hûn nikarin bi
dest bixin, ji ber ku hûn naxwazin.
3 Hûn dixwazin û nikarin bistînin;
ji ber ku hûn bi armanca xerab,
bona di oxra azweriyên xwe de
bişuxulînin dixwazin. 4 Hûn, ya
zînakarno, ma hûn nizanin ku
hevaltiya bi dinê re ji Xwedê re

1 An jî: Xijende, marîjok.
2 Kufrê.
3 Partîvanî.
4 An jî: Diçînin.

neyartî ye? Yê bixwaze bi dinê re
bibe heval, xwe ji Xwedê re dike
neyar. 5 An jî bi we Nivîsa Pîroz,
bi berhewayî dibêje? Ma ruhê ku
di hundirê me de disekine, di de-
reca çavnebartiyê[1] de dixwaze?
6 Lê belê xêra hîn jî mezin dide.
Bo vê yekê ew dibêje:
Xwedê li dijî qureyan e, lê belê
xêrê ji dilnizman re dike[2].
7 Niha, bengî Xwedê bibin[3]! Lê
belê li dijî Îblîs bisekinin, dê ew ê
jî ji we bireve. 8 Nêzîkî Xwedê bi-
bin û ew ê nêzîkî we bibe! Ya gu-
nehkarno, destên xwe paqij bikin û
ya bêqirarno, dilê xwe pak bikin!
9 Bi keserê kevin û bi şîngirtinê
bigirîn; bila kenê we vegere şînê
û dilxweşiya we jî vegere keserê!
10 Li berya Xudan xwe nizm
bikin, dê ew ê we bilind bike.
11 Birayên min, zema hev û din
mekin! Kesê zema birayê xwe bike,
an jî birayê xwe daraz bike, dibe
mîna zagonê zem bike û zagonê
daraz bike; lê belê ger tu zagonê
daraz bikî, tuyê nebe şuxulkerê
zagonê, lê belê tuyê bibî daraz-
kirê wê. 12 Yê ku zagonê daniye û
darazkir e, yek e; yê ku şiyandarê
xelaskirinê û helaq kirinê ye, ew e;
lê belê tu, yê ku cîranê xwe daraz
dike, ma tu dibe kî?

*Hûn nizanin ku dê sibê çi bibe*

Lûq 12,16-20; M.Sil 27,1

13 Niha guhdarî bikin, hûn yên
dibêjin: Îroj an jî sibê em ê biçin
filan bajarî û em ê salekî li wir
bimînin û danûstendinê bikin
û qezencê bikin; 14 hûn ku, ni-
zanin dê sibê çi bibe. Ma jiyana
we çî ye ku? Hûn mîna hilma di
demekî kurt de xuya dibe, dawi-
yê winda dibe ne. 15 Divê dêv-
la vêya hûn bibêjin: Ger Xudan
bixwaze û em bijîn, em ê vana û
vana çêkin. 16 Lê belê, niha hûn
bi zimandirêjiya xwe ve pesnên
xwe didin! Hemû pesnahiyên ûsa
xerab in. 17 Niha, kesê ku tiştên
qenc yê hewceye bê çêkirin biza-
nibe û çê neke, ji bo wî guneh e.

*Îkazên li dijî dewlemendan*

Amo 5,11-12; 6,1-8

5 Niha guhdarî bikin, ya dewle-
mendno, ji berya felaketên ku
dê bên serên we biqêrin û bigirîn!
2 Hebûna we[4] riziyaye û kincên
we bizûzan xwarine. 3 Zêrên we
û zîvên we zingar girtine û dê
zingara vana li dijî we şahdeyiyê
bike, dê goştên we mîna agir bi-
xwe. We di rojên dawîn de xezîne
dan hev[5]! 4 A vay, heqdestê kar-
kerên zadên we çinandine ku we

1 An jî: Hesûdiyê.
2 M.Silêman 3:34
3 Histu ji Xwedê re xwar bikin!
4 An jî: Wariyeta we.
5 Kom kirin.

bi neheqî dest dane ser, diqêre û qêrîna oraqvanan gîhaşt guhê Xudanê artêşan! 5 Hûn li rûyê erdê, di nava zewq û zêdeyiyê de dijiyan; bona roja ku hûn ê bên serjêkirin, we dilên xwe xwedî kirin[1]! 6 We kesê rast, yê ku li dijberê we ranebûye daraz kirin û kuştin.

*Sebir bikin*

1.Kor 13,4

7 Niha, ya birano, heta hatina Xudan sebir bikin! A vay, cotkar heta barana pêşîn û paşîn bigire, ji bo dexla erdê ya hêja bi sebir kirinê ve disekine! 8 Hûn jî sebir bikin; dilên xwe bi hêz bikin; ji ber ku hatina Xudan nêz e! 9 Birano, bona ku hûn neyên daraz kirin, li dijî hev û din gotegotê mekin; a vay, Darazker li ber derî disekine! 10 Ya birano, peyxamberên ku bi navê Xudan ve axifîne, di tengasiyê de bi mînakiya sebirkirinê ve ji xwe re bigirin! 11 A vay, em ji yên li ber xwe dane re dilxweş dibêjin! We ji di ber xwe dana Eyûb bihîstin û we dîtin ku Xudan di dawiyê de bona wî çi kiriye; Xudan zehf bi dilovan[2] û bişefqet e.

12 Lê belê berî her tiştî, birayên min, bona ku hûn nekevin bin daraziyê, ne bona mafê ezman ne ya erdê, ne jî bi sondekî din sondê nexwin; lê bila: Erêya we erê û na ya we na be.

*Bi baweriyê ve dua bikin*

13 Ma yekî ji we di tengasiyê de ye? Bila dua bike. Ma yek dilxweş e? Bila qesîdeyan bibêje! 14 Ma yekî ji we nexweş e? Bila ew kalepîrên Dêrê[3] bide bang kirin û bi navê Xudan rûn li ser wî bikin û bona wî dua bikin 15 û duaya bi baweriyê ve hatiye kirin, dê nexweş xelas bike û dê Xudan wî rake ser pêlan û ger wî gunehan kiribe, dê ji wî re bên efû kirin. 16 Niha, bona ku hûn şîfayê bibînin, gunehên xwe ji hev û din re mukur bên[4] û bona hev û din dua bikin! Lavaya kesê rast, di kirina xwe de zehf bi çalak e. 17 Êlyas jî eynî mirovek mîna me bû û bona ku baran nebare, wî bi xîret ve dua kir û sê sal û şeş mehî baran li rûyê erdê nebarî. 18 Û dîsa dua kir û ezman baranê da û zevî jî dexla xwe da[5].

19 Birayên min, ger ji nava we, yek ji rastiyê ve çewt bibe û ger yek wî vegerîne, 20 bila bizanibe ku, yê gunehkar ji çewtiya rêya wî ve vegerandiye, dê ji mirinê ve canekî xelas bike û gellek gunehan binixumîne.

---

1 An jî: Xwe dermale kirin.
2 Li ber dikeve.
3 Civaka bawerkiran.
4 Îtiraf bikin.
5 An jî: Dexla xwe çê kir.

# NAMEYA PÊTRÛS YA YEKEMÎN

SERETAYA DI CERIBANDINAN DE

*Pêşgotin*

Ev nameya ku di kaltiya Şagirt Pêtrûs de, bi peyxama Xwedê ve ji Romayê hatiye nivîsandin, bona hemû Civakên bawerkiran yên belavbûyî li Enedolê ne hatiye nivîsandin (5:13; 1:1,2). Pêtrûs di vê nameyê de alîkirina birayên xwe (Lûq. 22:32) û ajotina keriyê Xwedê ji xwe re kiriye armanc (Yû. 21:15-17). Babeta giştî, di derheqê serdestiya di nava lêdanan de ye.

Mesîh bingeha hêviyê ye (1:3). Berxikê ku bi qurbanî ve hatiye pêşkêş kirin e (1:19). Yê bi metirsiyek mezin li hemberê lêdanan ve disekine ye (2:23). Yê ku gunehên me li xwe bar kiriye yî (2:24). Şivanê can e (2:25). Xudanê bilind bûyî ye (3:22). Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Xelasiya birewnaqî 1:1-21
2. Jiyana yê xelas dibe 1:22-2:8
3. Wezîfeyên kesê xelas bûyî 3:14-4:19
4. Berxwedana li hemberê êşên mezin 3:14-4:19
5. Îkaz û bixwestek kirin birra 5

*Destpêk û silav*

1 Ji Pêtrûsê şagirtê Îsa Mesîh,
li gor pêşîzanîna Bav Xwedê,
2 ji yê xerîbên ku bi pîrozkirina Ruh,
bona îtaetkirinê û bona reşandina
xwîna Îsa Mesîh hatine bijartin û li
Pontûsê, Galatyayê, Kapadokyayê,
Asya û Bîtînyayê belav bûne re:
Bila xêr û xweşî ji we re zêde bibe!

*Mêrasa bawermendan*

Rom 8,16-39

3 Bila ji Bav û Xwedayê Xudanê
me Îsa Mesîh re pesnahî be ku,
wî li gor xêra xwe yî mezin, bi ji
mirinê vejandina Îsa Mesîh, me
gîhand hêviyekî zindî, narize û
bêgemar û naçilmise 4 û me, ji
mêrasekî ku bona me di ezmanan
de veşartiye re, dîsa welidandin;
5 lê hûn jî, bona xelasiyek di dema
dawî de bi hêza Xwedê dê bête kişf
kirin amade ye, têne parastin. 6 Bo
vê sedemê, niha ger hewce bike
ku hûn di nava demekî kurt de,
di nava tewr bi tewr ceribandinan
de êş û keseran bikişînin jî, hûn bi
dilxweşiyê ve bicoş dibin; 7 da ku,

di kişif kirina Îsa Mesîh de, bila ce-
ribandina baweriya we, ya ji zêrê
çawa ku fanî[1] ye, bi agir ve tête safî
kirin hîn jî bi qîmettir e, ji we re
bibe pesnahî, bilindahî û şeref[2].
8 Çawa ku we wî nedîtine lê dîsa jî
hûn jê hez dikin; niha bi nedîtinê,
lê belê bi wî bawerî anînê; 9 bi
gîhaştina we ya dawiya baweriya
xwe, xelasiya canên xwe, hûn bi
kêfxweşiyek mezin ku nayê go-
tinê[3] gellekî dilşa dibin.
10 Peyxamberên qala xêra ku
dê ji we re bê bexşandin kiri-
ne, di derheqê vê xelasiyê de,
nêrîn û lêkolînên bi balkêşî kirin.
11 Dema Ruhê Mesîh yê di wan
de ye, ji berê ve, ji keserên Mesîh
re û ji bilindahiyên li pey wan e
re, şahdeyiyê kir, li ser; ka çi dem
e an jî, kîjan demê nîşan dike,
lêkolînê kirin. 12 Ji wan re hate
kişf kirin ku, tiştên, niha bi hêza
Ruhê Pîrozê ji ezmanan ve hati-
ye şandin, ji aliyê kesên Mizgî-
niyê waz dikin ve, ji we re hatin
têgîhandin; ne ji xwe re, lê belê
ji we re xizmetê dikin; milyaket
dixwazin li van tiştan binihêrin.

*Pîroz bin*

1.Sel 4,1-7; Ef 4,17-24; Îbr 12,14; Ef 5,1-2

13 Bo vê sedemê hişê xwe bona
lêkeran amade bikin, hişyar bibin;
hêviya xwe, bitumî bi xêra ku dê bi
xuyaniya Îsa Mesîh ve ji we re bê
dayîn ve girê bidin! 14 Hûn mîna
zarokên îtaetê, li pey azweriyên
xwe yî dema nezaniyê ya derbas
bûyî neçin; 15 lê çawa yê ku bangî
we kiriye pîroz e, hûn jî di hemû
tevgerên xwe de pîroz bin! 16 Ji
ber ku hatiye nivîsandin: Pîroz bin,
ji ber ku ez pîroz im[4]!
17 Û ger hûn, yê ku tu cihêtiyê ji
şexsan re nake û her yekê li gor
karên wan darazî dike, bi navê
Bavo bang dikin bin, wextê xwe
yî xerîbiyê bi tirsê ve derbas bikin.
18 Û hûn dizanin ku, hûn ji jiyana
xwe yî vala ya ji bapîrên we ve
mayî, ne bi tiştên fanî[5], ne bi zêr,
an jî zîvan ve, 19 lê belê bi fidya
biqîmet, bi xwîna Mesîh ya wekî
xwîna berxikekî bêqisûr û bêleke
ve xelas bûn. 20 Ew berî ava kiri-
na dinê hatibû bijartin, lê belê di
dawiya deman de, bona qenciya
we hate eşkere kirin. 21 Hûn ku,
yên bi navgîniya wî, baweriyê bi
Xwedayê ku wî ji mirinê ve vejan-
diye û bilind kiriye dikin; wusa
ku, bila baweriya we û hêviya we
di Xwedê de be.
22 Li pey rastiyê çûnê, we xwe safî
kirin û bona birayan bûn xwediyê
hezkirinekî ji dil; li gor vêya bi dil
û can ji hev û din hez bikin; 23 ji

1 Mirinok.
2 Rûmet.
3 Nayê îfade kirinê.
4 (3.Mûsa 11:44-45)
5 Mirok, nemayînde.

ber ku hûn, ji tovekî ne bi mirin,
lê belê ji tovekî bê mirin, yanê bi
navgîniya gotina Xwedê ya zindî
û mayînî ye, ji nû ve welidîn[1].
24 Ji ber ku: Hemû afir mîna gîha
ne û hemû bilindahiya wê mîna
çîçeka gîhayê ye; gîha hişk dibe û
çîçeka wê dikeve.
25 Lê belê gotina Xudan abadîn
disekine[2].
Û gotina ku ji we re hatiye miz-
gînî kirin ev e.

2 Niha her xerabiyê û her hîle
û durûtiyê, çavnebariyan û
hemû îftirayan ji ser xwe bavêjin
2 û ger we qenciya Xudan tahm
kiribin, mîna pitikên nû bûyî ne,
3 bêriya şîrê ruhanî[3], yê bêhîle
bikin, da ku, hûn bona xelasiyê bi
wê ve mezin bibin.

*Kevirê zindî û gelê bijartî*

K.Şa 4,11-12; Ef 2,20-22; 1.Kor 3,6-17;
Pey 1,5-6

4 Nêzîkî wî, kevirê ku ji aliyê mi-
rovan ve hatiye red kirin, lê belê
li cem Xwedê bijartî û bi rûmet
û zindî ye bûn; 5 hûn jî bona bi
navgîniya Îsa Mesîh, qûrbanên
ruhanî yên ji Xwedê re meqbûl in
pêşkêş bikin bona bibin kahînti-
ya pîroz, wekî xaniyek ruhanî bin
mîna kevirên zindî têne ava kirin.
6 Ji ber ku di Nivîsa Pîroz de tê
gotin: A vay, ez kevirekî datînim
Siyonê, kevirekî quncikê yê bijar-
tî û qîmetdar.
Û yê baweriyê bi wî bîne, dê tu
carî nayê şermezar kirin[4].
7 Bona we, yên baweriyê kirine[5],
ev kevira qîmetdar e; lê belê bona
bêbaweran: Kevirê ku çêkeran
red kirin, a vay, bû kevirê serê
quncikê û 8 kevirê tilpekî û latê
xij bûnê[6].
Ew xij dibin, ji ber ku ji kelamê
re îtaet nakin û bona vêya hatine
bijartin.
9 Lê belê bona ku hûn, xavêna, yê
ku we ji tariyê, bangî nûra xwe yî
şaşkir kiriye, bang bikin, hûn nî-
jadek hatiye bijartin, kahînên Qi-
ral, neteweyek pîroz, netawa ras-
teqîn in[7]; 10 demekê hûn ne gel
bûn, lê belê niha hûn gelê Xwedê
ne û demekê hûn negîhaştibûn di-
lovaniyê, lê belê hûn niha gîhaştin
dilovaniyê.

*Bawermend li dinê xerîb in*

Tît 2,11-15; Met 5,14-16

11 Ya xoşewîstno, ez li ber we
digerim, ji azweriyên bedenî yên
li dijî canê ve şer dikin; wekî xe-
rîb û mêvanan birevin; 12 di nav

---

1 An jî: Ji nû ve bûn.
2 An jî: Dimîne, Îşaya 40:6-8
3 Gotina Xwedê.
4 An jî: Tu carî nên şermandin, Îşaya 28:16
5 Anîne.
6 Zebûr 118:22
7 Heq, derûn.

bêbaweran de jiyanek qenc bidomînin; ûsa ku, mîna we xerabiyê kirine, îftira bavên we jî, bila bi dîtina karên we yî qenc, Xwedê, di roja ku nêzîkî wan dibe de bilind bikin.
13 Bona navê Xudan, bengî her sazûmana ku di nava mirovan de rayedar hatiye danîn, ji qiralên di ser her tiştî de ne 14 û ji waliyên ku bona hewcedarî bibîne yên xerabiyê kirine bi ceza bike û yên qenciyê kirine bi xelat bike, ji aliyê qiral ve hatiye şandin re, bin. 15 Ji ber ku xwesteka Xwedê ew e; hûn bi qencîkirina xwe, nezaniya bêaqilan, bêdeng bihêlin; 16 mîna mirovên azad bijîn; lê belê azadiya xwe jî bona xerabî kirinê mekin mahne; lê wekî qûlên Xwedê bijîn. 17 Hurmetê ji hemû mirovan re bikin. Ji biratiyê hez bikin. Ji Xwedê ve bitirsin, hurmetê ji qiral re bikin!

*Mîna Îsa Mesîh îtaet bikin*

Ef 6,5-8; Tît 2,9-10; 1.Pêt 3,14-18; Îşa 53,3-12; Met 16,24

18 Ya xizmetkarno, tenê ne ji efendiyên xwe yî qenc û xûnerm re, lê belê ji yên eks[1] re jî bi birêziyek bêkêmasî îtaet bikin! 19 Ji ber ku ger kesek, dema bi neheqiyê êşê bikişîne û li berya Xwedê ji ber ûcdanê baldirêjiyê ji keseran re bike, ev hêja ye. 20 Ji ber ku dema hûn bi gunehkirinê kulmikan bixwin, hûn sebir bikin, ma çi rûmeta wê heye? Lê belê ger hûn bi qencîkirinê keseran bikişînin û sebir bikin, li cem Xwedê ev meqbûl e. 21 Ji ber ku bona vêya ji we re hate bang kirin; lewre Mesîh jî, bona hûn di şopa wî de biçin, ji bo we keser kişand û ji we re bû mînak. 22 Wî guneh nekir, ji devê wî gotinek bi hîle derneket; 23 dema xeberan ji wî re dan, wî bi xeberdanê ve bersivê neda; dema keseran dikişand, tu kes tehdît nekir[2]; lê belê doza xwe ji yê ku bi dadî daraz dike re hişt. 24 Bona em li hemberî gunehan mirîbin, di oxra rastiyê de bijîn, wî bi xwe gunehên me di xaçê de li ser bedena xwe bar kir; we bi birînên wî şîfa dîtin. 25 Ji ber ku hûn mîna pezên ji rê çewt bûne bûn, lê belê niha hûn vegeriyan Şivan û Çavnêriyên canên xwe.

*Têkiliyên pîrek û zilaman*

Kol 3,18-19; 1.Tîm 2,9-15; Ef 5,22-33

3 Ya pîrekno, mîna vêya, hûn bengî zilamên xwe bin; da ku, ger hinekên, ji kelamê re îtaet nekin, 2 bila di tirsê de jiyana we yî paqij bibînin û bi jiyana pîrekên xwe, bê gotin bêne qezenc ki-

1 An jî: Bêxû.

2 Gefa li tu kesî nexwar.

rin. 3 Bila xemla we mîna porên
mûnandî, xemilandina zêran û
kincên xweşik ji dervîn nebe;
4 lê bila hebûna we yî hundirîn ya
veşartî, bi xweşikya ruhekî aram
û naçilmise bibe xemla we; vêya
li ber Xwedê zehf qîmetdar e. 5 Ji
ber ku pîrekên pîroz yên berê, hê-
viya xwe bi Xwedê ve girêdabûn
jî, bengî zilamên xwe dibûn û bi vî
awayî xwe dixemilandin; 6 çawa
ku Sara ji Birahîm re digot: Efen-
diyê min û guh dida gotina wî.
Ger hûn qenciyê bikin û bi tu tirsê
nekevin, hûnê jî bibin zarokê wê.
7 Ya zilamno, hûn jî mîna vêya, wekî
hurmetê ji yê hîn jî lawaz û hem-
mêraskerê xêra jiyanê ve bikin, hur-
metê ji pîrekê re bikin, tevî pîrekên
xwe di dayîra aqil de rûnin, da ku,
bila nebe astengê duayên we.

*Di oxra rastiyê de êş kişandin*

Rom 12,14-21; Met 5,43-48

8 Bi kurtî, hûn hemû hemfikir,
hemderd, ji bira hezkir, bi şewqet,
dilnizm bin! 9 Bi xerabiyê, ber-
siva xerabiyê, an jî bi heqeretê,
bersiva heqeretê nedin, lê belê li
dijî vêya duaya xêrê bikin; ji ber
ku bona hûn bibin mêraskerê be-
reketê, hûn bona vêya hatin bang
kirin. 10 Ji ber ku:
Yên ku ji jiyanê hez dikin û di-
xwazin rojên qenc bibînin,
bila zimanê xwe ji xerabiyê û
lêvên xwe jî ji gotinê bi hîle ve
dûr bigirin.
11 Û bila xwe ji xerabiyê biparêze
û qenciyê bike; li dilxweşiyê bi-
gere û li pey wê baz de!
12 Ji ber ku çavên Xudan, li ser
kesên salih in û guhên wî, li ber-
gerînên wan dibihîzin; lê belê
rûyê Xudan, li dijî xerabî kiran ve
disekine[1]!
13 Ger hûn di qencî kirinê de bi xîret
bin, dê kî xerabiyê bi we ve bike?
14 Lê belê ger hûn di oxra rastiyê
de keseran bikişînin jî, çi dilxweşî
ji we re! Ji yên ku ew ji wan ditir-
sin metirsin û bi teşqelê mekevin;
15 lê belê Mesîh bi Xudan bûnê
ve, di dilên xwe de pîroz bikin;
bila ûcdanê qenc di we de hebe û
di derheqê hêviya ku di we de heye
de, ji her yê ku ji we sedemê bipir-
se, her tim bi xûnermî û bi hurmetê
ve bona bersivdayînê amade bin;
16 da ku, kesên jiyana we yî qenc
ya di Mesîh de dişermînin, bila di
tiştê ku we şermezar kirine de bêne
şermezar kirin. 17 Ji ber ku ger
xwestina Xwedê ev be; qencî kirin
û keser kişandin, ji xerabî kirin û
keser kişandinê ve hîn jî çêtir e.

*Di mînakiya Îsa Mesîh de ji bo Xwedê bijîn*

1.Pêt 2,19-24; Fîl 1,27-2,15

18 Ji ber ku, Mesîh jî bona me
bighîne Xwedê bi kesê rast bûna

---

[1] Zebûr 34:12-16

xwe, di oxra kesên ne rast de, bi
qurban bûna gunehan ve carekê
mir; ji aliyê bedenê ve hatiye
kuştin[1], lê belê di ruh de hatiye
vejandinê; 19 ew di ruh de çû
û ji ruhên di zîndanê de ne re jî
waz da; 20 vana demekê, wex-
ta keştiya Nûh dihat ava kirin,
dema Xwedê li benda sebrê bû,
bêîtaet bûbûn; di wê keştiyê de
kêm meriv, yanê, heyşt can, bi
avê ve xelas bûn; 21 ew jî, yanê,
vaftîzê ne avêtina gemariya be-
denê, lê belê xwesteka ûcdanê
paqij, ya berî daye Xwedê ye; li
gor mînakbûna rasteqîn bi vejîna
Îsa Mesîh ve, niha me xelas dike.
22 Bi xwe derketiye ezman, wekî
milyaket û rayedarî û qudretan[2]
bengî wî hatine kirin, li aliyê
rastê Xwedê ye.

4 Niha ji ber Mesîh, di bedenê de
êşan kişandiye, hûn jî bi vî fikrî
ve xwe biçek bikin[3]; ji ber ku yê di
bedenê de êşan kişandiye, dev ji gu-
nehan berdaye; 2 da ku, hûn wexta
we yî di bedenê de paş ve mayî êdî
ne li gor azweriyên mirovan, lê belê
li gor xwestina Xwedê bijîn. 3 Ji ber
ku êdî bes e, kirinên we yî kesên
bêbaweran û rojên we yî di derbas-
bûnê de, we di nava sefahat, şehwet,
serxweşî û kêfxweşiyên bi harî
de, civakên araqê û jiyana di nava
pûtperestiya erjeng de xerc kirine!
4 Yên bêbawer, ji ber ku hûn
xwe bi wan re navêjin eynî sefa-
heta bi harî, ecêb dibînin û niha
xeberan ji we re didin; 5 dê ew ê
hisabê bidin yê ku ji bo daraz ki-
rina kesên zindî û mirî amade ye.
6 Ji ber ku Mizgînî ji miriyan re jî
hate têgîhandin; ûsa ku, ew jî bila di
bedenê de li gor mirovan bên daraz
kirin, lê belê di ruh de li gor Xwedê
bijîn.
7 Lê belê dawiya her tiştî nêzîk
e. Bona vê yekê, bi rastdîtin bin
û bona dua kirinê ve hişyar bin.
8 Bila berî her tiştî, hezkirina we
yî bi hev û din re, ji dil û can be;
ji ber ku hezkirin, gellek gunehan
dinixumîne. 9 Bê gotegot li hem-
berî hev, ji hev û din re mêvan-
perwer bin! 10 Her yekî we, kîjan
xelata ruhanî girtibe, wê xelatê bi
keyatiya xêra Xwedê ya pirr alî,
bona xizmet kirina ji hev û din
re bişuxulînin. 11 Ger yek diaxi-
fe, bila mîna gotinên Xwedê tê-
dighîne biaxife; ger yek xizmetê
dike, bila bi hêza ku Xwedê dide
ve xizmetê bike; da ku, bila bi
navgîniya Îsa Mesîh ve, Xwedê
di her tiştî de bê bilind kirin. Bi-
lindî û qudret heta bêdawiyan ya
wî ye! Amîn.

1 An jî: Miriye.
2 An jî: Hêz.
3 An jî: Bixemilînin.

*Di oxra Mesîh de êş kişandin*

Met 5,10-12; K.Şa 5,41; 14,22;
2.Sel 1,4-12

12 Ya xoşewîstno, ceribandina bi
agir ya di nav we de, ya ku bona
azmûn kirina we[1] ye, wekî tiştekî
ecêb ji we re dibe, biyan nehe-
sibînin; 13 lê belê qasî ku hûn
dibin şirîkê êşên Mesîh kêfxweş
bibin, da ku, dema rewnaqiya wî
xuya bibe, hûn bi kêfxweşiyê ve
bicoş bibin. 14 Xwezî li we ku,
ger hûn ji ber navê Mesîh tadê bi-
bînin! Ji ber ku Ruhê Xwedê yê
bilind li ser we disekine. 15 Lê
belê bila tu kes ji we, bi kesekî
qesas, an diz, an xerabî kir, an jî
yekî destê xwe dixe karên kesên
din bûnê ve êşan nekişînin. 16 Lê
belê ger ew bi Mesîhîbûna xwe ve
keseran bikişîne, bila neşerme; lê
bila bi vî navê Xwedê bilind bike!
17 Ji ber ku, dema destpêka daraz
kirina ji mala Xwedê ve ye û ger
pêşiyê ji me dest pê bike, dê dawi-
ya kesên ku ji Mizgîniya Xwedê
re îtaet nakin, çi bibe? 18 Û: Ger
kesekî rast, bi zoriyê xelas bibe,
dê kesê bêxwedê û gunehkar xwe
li ku derê bibîne[2]?
19 Ji bo vêya, kesên ku li gor
xwestina Xwedê êşê dikişînin,
bila bi qencî kirinê ve canê xwe
emanetî Afirkirê dilsoz e, bikin.

*Îkazên bona kalepîran*

K.Şa 20,28; Hêz 34,11-16

5 Niha ji kalepîrên ku di nava we
de ne, ez jî mîna wan kalepîr û
şahdeyê keserên ku Mesîh kişandine
û bi pardarbûna xwe yî bilindahiya
ku dê bête kişif kirin ve rica dikim:
2 Keriyê Xwedê, yê ku li cem we
ye, ne bi mecbûriyetê, lê belê bi
xwestekê, ne bo qezenca neheqî,
3 lê belê bi xwestekê, ne mîna ku
hûn miseletî yên ji we re hatine ema-
net kirin bibin, lê belê wekî ji keriyê
re bibin mînak, bajon[3]! 4 Û dema ku
Serşivan xuyanî bibe, hûnê taca bi-
lindahiyê ya ku naçilmise bistînin.

*Îkazên bona dilnizmiyê*

Aqûp 4,6-8.10; Ef 6,10-18

5 Hûn jî ya ciwanîno, bengî ka-
lepîran bin û hûn hemû li hem-
berî hev û din bi dilnizmiyê ve
bixemilin! Ji ber ku: Xwedê li dijî
qureyan[4] e, lê belê xêrê ji dilniz-
man re dike.
6 Niha, bona ku di demekî li cîh
de we bilind bike, xwe li bin destê
Xwedayê bi qudret ve nizm bikin!
7 Hemû xemên xwe bavêjin ser
wî[5]; ji ber ku ew ê alîkariyê bi we
re bike[6].
8 Heşar û şiyar bin! Ji ber ku ne-
yarê we Îblîs, bona daqurtîne li yekî
digere û mîna şêrekî dugirmije; 9 bi

---

1 Îmtihan kirina we.
2 An jî: Dê ji kesê bêxwedê û gunehkar re çi bibe?
3 Li gor Xwedê bajon.
4 Bikubran, betranan.
5 An jî: Hemû xemên xwe li wî bar bikin.
6 An jî: Dê ew ê rewşa we bifikire, we biparêze.

zanîna li her derê dinê birayên we
jî eynî êşê dikişîne, di baweriyê de
pêdandî li dijî wî bisekinin[1]. 10 Û
yê ku di Mesîh de bona bilindahi-
ya xwe yî abadîn bangî we kiriye,
Xwedayê hemû xêran, paşî de-
mekê ku hûn keseran bikişînin, dê
we rayedar bike, zexm bike, xwurt
bike! 11 Bila qudret, heta bi abadî-
na abadînan ji wî re be! Amîn.

*Gotin û silavên dawîn*

12 Min bi navgîniya Sîlvanos yê
ku ez wî birayekî dilsoz dihesibî-
nim, bi kurtî ji we re nivîsand; min
we teşwîq kir û bi gotina; xêra
Xwedê ya rasteqîn ev e; şahdeyiyê
kirim, di wê de bisekinin.
13 Yên ku li Babîlê tevî we hatine
bijartin[2] û kurê min Marqos sila-
van ji we re dikin. Ji hev û din re bi
ramûsana hezkirinê ve silav bikin!
14 Bila ji we re, ji hemûyên ku di
Mesîh de ne re xweşî bibe!

---

1 An jî: Li hemberê Îblîs li ber xwe bidin.

2 An jî: Dêra ku bi we re hatiye bijartin.

# NAMEYA PÊTRÛS YA DUWEMÎN

## ÎKAZÊN LI HEMBER ŞAGIRTÊN XERAB

*Pêşgotin*

Ev nameya ku Pêtrûs bi peyxama Xwedê di dawiya temena xwe de nivîsandiye, Civakan li hemberê hînkariyên çewt, qerfok û jiyana bê ûsil ve îkaz dike (birrên 2. û 3). Wekheviyên vê nameyê û yên nameya ji Tîmotêyos re 2 û nameya Cihûda pirr in.

Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Jiyana Ruhanî birra 1
2. Mamosteyên derewîn birra 2
3. Dawiya qerfokan birra 3

*Destpêk û silav*

1 Ji qûl û şagirtê Îsa Mesîh,
Şîmûn Pêtrûs ve, ji yên ku bi
saya rastiya Xwedê û Xelaskerê
me Îsa Mesîh ve baweriyekî biqî-
met mîna ya me stendine re: 2 Bila
di zanîna Xwedê û Xudanê me Îsa
de xêr û xweşî ji we re zêde bibe!

*Jiyîna li gor banga Xwedanî*

Tît 2,11-14; Ef 4,20-24

3 Ji ber, bi navgîniya zanîna yê ku
bi bilindahî û xawênî bangî me
dike, qudreta wî ya îlahî, hemû
tiştên aidî jiyanê û teqwayê daye
me; 4 bona, bi navgîniya vana,
wekî hûn ji şehwetê û fesadiya ku
li dinê heye xelas bûne bin û bi
vî awayî ji xwezaya îlahî re bibin
pardar, wadên bi rûmet û zehf me-
zin ji me re hatiye dayîn. 5 A vay,
ji ber vê yekê, bi nîşandayîna her
cûreyên xiretê, xawêniyê tevî ba-
weriya xwe, zanînê tevî xawêniya
xwe 6 û xwekontrolê tevî zanîna
xwe û hêza xwe yî li ber xwe danê
tevî xwekontrolê û teqwayê tevî
hêza xwe yî li ber xwe danê 7 û
birahezkirinê tevî teqwaya xwe û
hezkirinê tevî birahezkirina xwe
bikin. 8 Ji ber ku ger van tiştan di
we de hebin û zêde bibin, dê ew ê
di nas kirina Xudanê me Îsa Mesîh
de we bêbandûr û bêber nehêlin.
9 Ji ber ku yê di wî de van tiştan
nîne kor e, dûrê xwe nabîne û ji
gunehên xwe yî kevin paqij bûnê
ji bîr kiriye. 10 Ji bo vê yekê, ya
birano, bi zexmkirina[1] bangbûn
û bijartina xwe hîn jî zêde xîretê

[1] Bi zexmandin, pêdandin, an jî: Pêt kirin.

bikin; ji ber ku ger hûn van tiştan
bikin, tu carî tilpekî nabin. 11 Ji
ber ku, bi vî awayî dê ketina ser-
weriya bêdawî ya Xudanê me û
Xelaskerê me Îsa Mesîh, bi co-
merdî ji we re bê pêyde kirin.

*Biryariya rastiya gotinên peyxamberan*

1.Yû 1,1-4; Met 17,1-6; Rom 16,25-27; 2.Tîm 3,16

12 Ji bo vê yekê, her çiqas hûn van
tiştan zanebin û bi rastiya ku hûn lê
xwedî ne hatibin zexmandin jî, ez
ê, bona ku vana bînim bîra we her
tim amade bim. 13 Û heta dema ku
ez di vê konê de bim, ez ji we re
bîranînê û hîşyar kirinê rast dihe-
sibînim 14 û ez dizanim, mîna ku
Xudanê me Îsa Mesîh jî nîşanî min
daye, rakirina kona min nêzîk e.
15 Û bona ku, paşî koç kirina min
jî, hûn her tim van tiştan di bîra
xwe de bînin, ez ê xîretê bikim.
16 Ji ber ku dema me qudret û
hatina Xudanê me Îsa Mesîh tê-
gihandin we, em li pey çîrokên
derewîn ve neçûn; lê belê me rew-
naqiya wî bi çavên xwe ve dîtin.
17 Ji ber ku gava wî, ji Yê Bilind û
bi rewnaq e, bi dengê: Lawê minî
xoşewîst ev e; ez ji wî xoşnûd
im! dibêje, ji Bavo Xwedê ve bi-
lindahî û rûmetê girt. 18 Û gava
em li çiyayê pîroz bi wî re bûn, vî
dengê ji ezman ve hate, me bi xwe
bihîstin. 19 Û bi vî awayî, gotinên
peyxamberan, bona me hîn jî
biryariya mezin qezenc kirin; heta
ku roj dest pê bike[1] û stêrka sibehê
di dilê we de hilhatibe[2], hûn bala
xwe bidin van gotinên ku di cîhê
tarî de mîna çireya ronahî dide ne,
hûn ê qenc bikin. 20 Pêşiyê vêya
bizanibin ku, qet gotinek peyxam-
bertiyê yên di Nivîsên Pîroz de
ne, ne şîroveya kesekî ne. 21 Ji
ber ku peyxambertî, tu carî bi vi-
yana[3] mirovan ve nehatiye; lê belê
mirovên Xwedê yên pîroz, ji aliyê
Ruhê Pîroz ve hatin birêvebirin û
gotin[4].

*Îkazên li dijî hînkirên sexte*

K.Şa 20,29-30; Cihû 3-4; 16-19; 2.Kor 11,3-15; Pey 2,14-15; 2,20-23

2 Lê belê çawa ku di nava gel[5]
de peyxamberên sexte hebûn;
dê di nava we de jî hînkirên sexte
hebin; dê vana, Xudanê ku wan
stendiye[6] jî înkar bikin û bi dizîka
hînkariyên xerakirinê têxin nav
we; dê yên ûsa têkçûnek nişka ve
bînin serê xwe. 2 Û dê gellekan
li pey sefahata wan herin; ji ber
wana ji rêya rastiyê re xeber bête
dayîn. 3 Û ji berya çavbirçîtiyên
xwe, bi gotinên bêbinî dê keda we

1 Berbang spî bibe, roj derkeve.
2 Bizê, hilbê, şewle bike.
3 Daxwaz.
4 Peyîvîn.
5 Îsraêl.
6 Kirriye.

bixwin; lê belê daraziya ku ji zû
ve bona wan hatiye dayîn dereng
namîne û têkçûna ku li benda wan
e jî bi xewê ve naçe.
4 Ji ber ku ger Xwedê, milya-
ketên ku gunehan kirine nepa-
rast; lê belê wan avêt ceheneme û
di tariyê de li zincîran xist; heta
dema ku bên daraz kirin, dê li wir
bên girtin. 5 Û ger wî dinya kev-
nar neparast, lê belê dema tofanê
şand ser dinya bêxwedêyan, wai-
zê pak bûnê[1] Nûh, her çiqas heft
kesên din parastibe jî 6 û bajarên
Sodom û Gomora, bi xerakirin
û şewitandinê ve daraz kir; bi vî
awayî, mînakek li ser tiştên bê
serê bêxwedêyan da 7 û wî, Lûtê
salih, yê ji sefahata sereta nenasan
ve ezab dikişand xelas kir; 8 ji ber
ku ew ê salih, dema di nav wan de
rûdinişt, bi dîtin û bihîstinan, bi
karên wanî neheq roj bi roj tade li
canê xwe yî salih dikir[2]. 9 Xudan
dizane, yên di rêya wî de dimeşin[3]
dê çawa ji ceribandinan xelas bike
û neheqiyan û bi taybetî jî yên di
mindariya şehwetê de li pey be-
denê ve diçin û rayedariyê biçûk
dibînin, 10 dê çawa roja daraziyê
di bin biceza kirinê de bigire. Ev
kesên kanc û serhişk, ji kufirkiri-
na afirên bilind ve natirsin; 11 ya
rastî heta milyaketan jî, li gor ji
wan di hêz û qudretê de xurttir in
jî, lê li ber Xudan li dijî vana bi
kufirdanê ve daraziyê naynin.
12 Lê belê ew, mîna di xwezayi[4]
de heywanên ku bona bêne girtin
û telef kirin zayîne, mîna afirên
bêferaset, di tiştên ku cahilê wê
ne de, bi kufir kirinê ve, 13 wekî
mişeya neheqiyê be neheqiyê
kişandinê û bi rojê kêf kirinê mîna
zewqê dihesibînin; leke û şerm in;
dema bi we re bixwin û vexwin,
bi fenên xwe ve kêf dikin; 14 ça-
vên wanî bi zînayê ve tijî û ji gu-
nehkirinê ve şunda namînin hene
û canên bêtebat dixapînin; dilên
wanî ji temayiyê re hatiye hîn ki-
rin heye û zarokê naletê ne; 15 bi
girtina rêya Balamê lawê Beor,
rêya rast berdan û çewt bûn; wî,
ji mişeya neheqiyê hez kir; 16 lê
belê ew ji berya sûcên ku kiriye
hate pekandin[5]: Kerê bêdeng, bi
dengê mirovan ve got û bû astengê
harbûna peyxamber.
17 Ev kesan, mîna kaniyên bê av û
mija di ber bahozê de diçin in; ta-
riya reş di abadînê de li benda wan
e. 18 Ji ber, ji yên ku di rêya çewt
ve hîn nû xelas dibin, bi gotinên
qurre û vala ve, bi azweriyên ezi-
tiya xweza û bi şehwetên bedenê
ve dixapînin. 19 Azadiyê ji wan re
wad dikin, lê belê ew bi xwe dîlên

---

1 Rastiyê.
2 An jî: Roj bi roj di dilê xwe de êş û keseran dikişand.
3 Yên bawermend, oldar.
4 Tabîetên.
5 Hate azirandin.

mehfbûnê ne; ji ber ku kesek ji çi
re bindest bikeve, dibe dîlê wê.
20 Ji ber ger paşî ku bi zanîna Xu-
dan û Xelasker Îsa Mesîh ji min-
dariyên dinê ve xelas bibin, dîsa
bi tevlî wan bûyînê mexlûb bûbin,
rewşa wan ya dawîn ji ya rewşa
pêşîn ve hîn jî xerabtir bûye.
21 Ji ber, heta piştî ku rêya rast bi-
zanibin û ji emrê pîroz ya ji wan
re hatiye emanet kirin ve vegerin,
nezaniya vê rêya, dê bona wan hîn
jî qenctir bibûya. 22 Ji wan re li
gor metheloka rasteqîn bû: Kûçik
dîsa vegeriya verşiya xwe û beraz
jî paşî şûştinê bo di heriyê de bige-
mire[1], vegeriya.

*Roja Xudan*

3 Niha, ya xoşewîstno, ez vê
nameya duwemîn ji we re
dinivîsînim; di her duyan de jî,
gotinên ji berê ve ji aliyê pey-
xamberên pîroz ve hatine gotin û
2 bona ku, emirê Xudan û Xelas-
ker, yên ku bi navgîniya şagirtên
we ne, di bîra xwe de bînin, ez fik-
rê we yî saf, bi îkaz kirinê haydar
dikim. 3 Pêşiyê divê hûn vêya bi-
zanibin ku, dê di rojên dawîn de,
kesên qerfok li pey azweriyên xwe
ve biçin û: 4 Wada ku di derheqê
hatina wî de ye, li ku derê ye? Ji
ber ku ji roja xewa bavan ve[2], her
tişt ji destpêka afirandinê ve mîna
xwe disekinin, dê bi qerf kirinê ve
werin. 5 Ji ber, ew vêya mexsûs ji
bîr dikin ku, ezman ji bastanê ve[3]
û erd bi kelama Xwedê ve, ji avê
û bi navgîniya avê li ser pêlan, he-
bûn; 6 bi navgîniya vana dinya ya
wê demê, bi dewisandina avê ve
helaq bû; 7 lê belê ezman û erdê
niha, bi eynî kelamê, ji bona agir
hatine veşartin û heta roja helaqa
kesên bêxwedê, têne parastin.
8 Lê belê, ya xoşewîstno, vî yek
tiştî ji bîr mekin ku, li cem Xudan
rojek mîna hezar salî û hezar sal jî
mîna rojekê ye! 9 Mîna ku hin kes
dereng mayî dihesibînin, Xudan
di derheqê wada xwe de dereng
namîne; lê belê bi nexwestina he-
laqa hinekan, lê bona ku hemû mi-
rov vegerin tobê di derheqê we de
sebir dike. 10 Lê belê dê roja Xu-
dan, mîna dizekî were; dê di wê de
hemû ezman bi gurmîniyek ji holê
ve rabin û hebûnên bûjenî bi şewatê
ve tune bibin û erd û hemû karên di
wê de ne bişewitin û biqedin.

*Hêviya bawermendan û jiyana wanî pîroz*

1.Sel 5,1-10; 1.Pêt 1,13-16; Îşa 65,17;
Pey 21,1-5

11 Li gor her tişt bi vî awayî tune
bibin, divê hewceye ku hûn li
benda roja Xwedê bin û wê nêzîk

---

1 Bigevize.
2 Ji mirina kalikan ve, an jî: Ji mirina bapîran ve.
3 Ji herî berê ve.

bikin, di nav pîroziyê de bijîn û
di şopa çûna rêya Xwedê de bi-
bin kesên çawa? 12 Dê bi hatina
wê rojê ezman bi şewatê ve tune
bibin, hebûnên bûjenî jî di agirê
dijwar de bihulin! 13 Lê belê em
li gor wada wî li benda ezmanên
nû û erdekî nû ne, di wan de dad-
mendî[1] rûdine.
14 Bona vêya, ya xoşewîstno,
madem ku hûn li benda vana ne,
xîret bikin ku li ber wî hûn bêleke,
bêqisûr û di nava aşitiyê de bin!
15 Û sebra Xudanê me jî xelasiyê
bihesibînin; mîna ku birayê me
yî xoşewîst Pawlos jî bi zanyari-
ya ku ji wî re hatiye dayîn, ji we
re nivîsandiye; 16 herweha ew di
hemû nameyên xwe de di derheqê
van tiştan de dibêje. Di wan de
hinek cîh hene ku, bi zehmet[2] tên
fêhm kirin, kesên nezan û bêqi-
rar, mîna nivîsên pîroz yên din,
vana jî bona têkçûna xwe werdi-
gerînin. 17 Niha, ya xoşewîstno,
bona ku hûn di rêşaşiya kesên fa-
siq de neherikin û ji biqirarbûna
xwe ve venegerin, vana di pêşiyê
de bizanibin û xwe biparêzin!
18 Lê di xêra Xudan û Xelaskerê
me Îsa Mesîh de û di zanîna wî de
mezin bibin[3]! Niha û heta bêda-
wiyan bila ji wî re bilindahî bibe!
Amîn.

---

1 Rastî, heqî.
2 An jî: Bi zorê.
3 An jî: Geş bibin.

# NAMEYA YÛHENA YA YEKEMÎN

DI HEZKIRINÊ DE PARKIRINA RUHANÎ

*Pêşgotin*

Nameyên şagirt Yûhena, yên di dawiya sedsalê de û di dawiya temena xwe de, bi peyxama Xwedê ve nivîsandiye, dibe ku li Efesê hatibin nivîsandin. Di vê nameya giştî de van xetna bi ber çavê mirovan ve dikeve: Zarokên min (2:1,18,28; 3:7,18; 4:4,5:21). Birayên minî xoşewîst (3:2,21; 4:1,7,11). Bona nivîsandina nameyê ev her çar sedem bi ber çavan ve dikeve:

1. Bi serî anîna hezkirina bawerkiran (1:4)
2. Bawerkiran ji gunehan ve parastin (2:1)
3. Bawerkiran di derheqê hînkariyên derewîn de îkaz kirin (2:26)
4. Di bawerkiran de zeximandina baweriya Mesîh (5:13)

Mirov dikare bi vî awayî vê nameyê kurt bike:

1 .Xwedê jiyan û ronahî ye, birrên 1 û 2
2. Xwedê hezkirina rasteqîn e, birrên 3 û 4
3. Sereta li dijî xerabiyê ve serdest hatinê bawerî û hezkirin e, birra 5

*Gotina jiyanê, Xwedê jiyan û ronahî ye*

Yû 1,1-4.14; 17,20-23; 1.Yû 5,11-13

1 Di derheqê Gotina jiyanê de,
ya ku di destpêkê de hebû,
ya ku me bihîstiye, bi çavên xwe
dîtiye, temaşe kiriye û ya ku me
destê xwe tê daye, em wê didin
bihîstin[1]. 2 – Û jiyan xuya bû[2] û
me wî dît û em şahdeyiyê dikin
û em jiyana bêdawî ya ku bi Bav
re bû û xwe xuyayî me daye, wê
ji we re têdighînin–; 3 belê, tiştê
ku me dîtine û bihîstine ji we re jî
îlan dikin; da ku, paydariya we jî
tevî me hebe; paydariya me jî tevî
Bav û tevî Lawê wî Îsa Mesîh e.
4 Û bona ku kêfxweşiya we te-
mam bibe, em van tiştana ji we re
dinivîsînin.

*Di ronahiyê de bimeşin*

Ef 5,1-2; 5,8-14; 1.Yû 2,3-6; Tît 2,14; M.Sil 28,13; Zeb 32,1-5

5 Mizgîna ku me ji wî bihîst û niha
têdighînin we ev e: Xwedê ronahî
ye û di wî de qet tarî tune. 6 Ger
em; paydariya me tevî wî heye
bibêjin û di tariyê de bimeşîn, em

---

1 An jî: Têdighînin, îlan dikin.

2 Derket holê.

derew dibêjin û rastiyê nakin; 7 lê
belê mîna ku ew di ronahiyê de ye,
ger em jî di ronahiyê de bimeşin,
bi hev û din re paydariya me hebe
û xwîna Lawê wî Îsa Mesîh, me ji
her gunehî ve paqij dike. 8 Ger em
bibêjin ku gunehên me tune, em
xwe dixapînin û di nav me de[1] rastî
nabe. 9 Lê belê ger em gunehên xwe
mukir bên[2], bona ku gunehên me ji
me re efû bike û me ji her xerabiyê
ve safî bike, ew dilsoz û dadmend
e. 10 Ger em bibêjin ku me guneh
nekiriye, em wî[3] dikin derewçîn û
di me de gotina wî nabe.

*Şefaetkerê me Îsa Mesîh*

2 Ya zarokên min, bona ku hûn
gunehan mekin, ez van tiştana
ji we re dinivîsînim! Û ger gava
ku, kesek gunehan bike, di hizu-
ra Bav de mehdervanek[4] me, Îsa
Mesîhê dadmend[5] heye. 2 Û ew bi
xwe ji bo gunehên me û ne tenê
ji bo gunehên me, lê belê ji bo
hemûya dinê kefaret e.

*Bawermend bi emirên Xwedê ve digire û ji birayê xwe hez dike*

Met 7,21-23; Yû 14,21-24; 15,12-14

3 Û ger em bi emirên wî bigirin, em
bi vêya bizanin ku, em wî nas dikin.
4 Yê ku dibêje ez wî nas dikim û bi
emirên wî nagire[6], ew derewçîn e û
di wî de rastî nîne; 5 lê belê yê ku
bi gotina wî bigire, hezkirina Xwe-
dê di wî de bi rastî rayedar bûye.
Em bi vêya fêhm dikin ku, em di
wî de ne. 6 Yên ku dibêje, ez di wî
de disekinim, ew çawa meşiya be,
divê ku ew jî ûsa bimeşe.
7 Ya xoşewîstno, ez ji we re ne
emrekî nû, lê belê emrê ku ji dest-
pêkê ve bona we ye dinivîsînim;
emirê kevn, gotina ku we bihîsti-
ne ye. 8 Ez dîsa jî emrekî nû ji we
re dinivîsînim; ew tişt di wî de û
di we de rasteqînî ye; ji ber ku tarî
derbas dibe û ronahiya rasteqîn ji
niha ve şewle dide. 9 Yê ku dibêje
ez di ronahiyê de me û ji birayê
xwe dikeribe, ew heta niha di ta-
riyê de ye. 10 Yê ku ji birayê xwe
hez dike, di ronahiyê de dimîne
û di wî de sedema tilpekîbûnê
tune[7]. 11 Lê belê yê ku ji birayê
xwe dikeribe, di tariyê de ye û di
tariyê de dimeşe û nizane ku diçe
ku derê; ji ber ku tariyê çavên wî
kor kirine.
12 Ya zarokno, ez ji we re dini-
vîsînim; ji ber ku di oxra navê
wî de gunehên we ji we re hatin
bexşandin.
13 Ya bavikno, ez ji we re dinivîsî-
nim; ji ber ku hûn yê di destpêkê

---

1 An jî: Di dilê me de.
2 Bînin ziman û eşkere bikin.
3 Xwedê.
4 Şefaetkerek.
5 Adil.
6 Nîne cîh.
7 An jî: Nabe sedema tilpekî bûna kesî jî.

de heye nas dikin. Ya xortno, ez ji
we re dinivîsînim; ji ber ku we yê
xerab, mexlûb kirin. Ya zarokno,
ez ji we re dinivîsînim; ji ber ku
hûn Bav nas dikin.
14 Ya bavikno, min ji we re nivî-
sand; ji ber ku hûn yê di destpêkê
de heye nas dikin. Ya xortno, min
ji we re nivîsand; ji ber ku hûn
bihêz in û gotina Xwedê di nav
we de dimîne û we yê xerab, mex-
lûb kirin.

*Îkazên li dijî ji dinê hezkirinê*

Aqûp 4,4; Gal 6,14

15 Ji dinê û ji tiştê ku di dinê de ne,
hez mekin! Ger kesek ji dinê hez
bike, di wî de hezkirina Bav nîne.
16 Ji ber ku hemû tiştên di dinê de
ne, şehweta bedenê, şehweta ça-
van û jîna madî ya ku xururê dide,
ne ji Bav, lê belê ji dinê ye. 17 Û
dinya û şehweta wê derbas dibin,
lê belê yê ku xwestina Xwedê tîne
cîh, heta bêdawiyê dimîne[1].

*Dijberê Mesîh*

1.Yû 4,1-6; 2.Yû 7-11; Cihû 3-4

18 Ya zarokên biçûk, ev saeta
dawîn e! Û mîna ku we bihîsti-
ne, dijberê Mesîh tê; niha jî zehf
dijberê Mesîh peyda bûne; ji ber
vêya em dizanin ku, ev saeta
dawîn e. 19 Ew ji nav me der-
ketin, lê belê ne ji me bûn; ji ber
ku ger ew ji me bûna, dê li cem
me bimana. Lê belê veqetandina
wan nîşan da ku, ew hemû ne ji
me bûn. 20 Û yê we, ji aliyê yê
pîroz ve mesha we heye û hûn
bi her tiştî dizanin. 21 Ne bona
ku hûn bi rastiyê nizanin, lê belê
ji ber ku hûn bi wê dizanin û di-
zanin ku her derew ne ji rastiyê
ye, min ji we re nivîsand. 22 Ma
yê ku Mesîhiya Îsa înkar dike ne
derewçîn be, kî derewçîn e? Yê
ku Bav û Law înkar dike, dijberê
Mesîh e. 23 Di her kesê ku Law
înkar dike de, Bav jî nîne; di kesê
ku Law mukir tê de[2], Bav jî heye.
24 Yê ku we ji destpêkê ve bihîs-
tiye, bila di nav we de bimîne!
Ger yê ku we ji destpêkê ve bihîs-
tiye di naw we de bimîne, hûn ê
jî di Law û di Bav de bimînin.
25 Û wada ku wî ji me re wad ki-
riye ev e, jiyana bêdawîn e.
26 Min van tiştan di derheqê yên
ku dixwazin we ji rê ve derxînin
de, ji we re nivîsandin. 27 Û ger
em bên we, ew mesha ku we ji
wî stendine, dê di we de bimîne
û hewcedariya we nîne ku kesek
ji we re bide hîn kirinê; lê belê
mesha wî di derheqê her tiştî
de çawa bi we dide hîn kirin û
rasteqîn e û ne derew e û çawa
hînî we kiribe, hûn ê di wê de
bimînin.

1 An jî: Heta bêdawiyê dijî.

2 Di her kesê ku Law qebûl dike de.

*Zarokên Xwedê yên rasteqîn*

28 Û niha, ya zarokno, bona ku,
ger ew xuya bibe, bila dilawêriya
me hebe[1] û di xuyabûna wî de em
ji ber wî ne şermin, di wî de bise-
kinin. 29 Ger hûn bizanibin ku ew
rast e, hûn ê bizanibin ku her kesê
dadiyê[2] dike jî ji wî bûyîne[3].

3 Binêrin, bona ku em bi gotina;
zarokên Xwedê bêne bang
kirin, Bav çi cûreyê hezkirin da
me û em ûsa ne! Ji ber vê sedemê
dinê me nas nake, ji ber ku wê wî
nas nekir. 2 Ya xoşewîstno, em
niha zarokên Xwedê ne û ji me re
hîn nehate nîşandan ku em ê çawa
bibin. Ger ew xuya bibe, em di-
zanin ku em ê bibin mîna wî; ji
ber ku ew çawa be, em ê wî ûsa
bibînin. 3 Û her kesê ku hêvî bi wî
girê daye, mîna ku ew pak e, ew jî
xwe ûsa pak dike.
4 Her yê ku guneh dike, êrîşî za-
gonê dike û guneh, êrîşkirina za-
gonê ye. 5 Û hûn dizanin ku ew
bona rakirina gunehan xuya bûye[4]
û di wî de guneh tune ye. 6 Her
kesê ku di wî de disekine, gunehê
nake; her yê ku gunehê dike, wî
nedîtiye û wî nas nekiriye.
7 Ya zarokno, bila kes we çewt
neke[5]! Çawa ku ew salih e, yê ku
rastiyê dike salih e. 8 Yê ku guneh
dike, ji Îblîs e; ji ber ku Îblîs ji dest-
pêkê ve gunehan dike. Ji ber vê
yekê Lawê Xwedê hate xuya kirin
ku, karên Îblîs xera bike[6]. 9 Her yê
ku ji Xwedê ve bûye[7], gunehê nake;
ji ber ku tova wî[8]di wî de dimîne
û ew nikare gunehê bike, ji ber ku
ew ji Xwedê ve bûye[9]. 10 Zarokên
Xwedê û zarokên Îblîs di vêya de
tên kifş kirin[10]; her kesê ku rastiyê
nake û ji birayê xwe hez nake, ne ji
Xwedê ye.

*Ji hev û din hez bikin*

Yû 15,12; 1.Sel 3,12; 4,9-10

11 Ji ber, temiya[11] ku we di dest-
pêkê de bihîstine ev e: Em ji hev û
din hez bikin! 12 Ne mîna Kayînê
ku ji xerab ve bû û birayê xwe
kuşt. Û çima wî ew kuşt? Ji ber ku
karên wî xerab, lê belê yên birayê
wî salih bûn.
13 Ya birano, ger dinya ji we bike-
rihe, xwe şaş mekin! 14 Em diza-
nin ku em ji mirinê ve derbasî ji-
yanê bûne; ji ber ku em birayan hez
dikin. Yê ku hez nake, di mirinê de
dimîne. 15 Her kesê ku ji birayê

---

1 Bila cesareta me hebe.
2 Rastiyê.
3 Welidîne.
4 Hatiye.
5 Nexapîne.
6 Yanê bona tunekirina tiştên ku Îblîs dike hat.
7 Welidiye, yanê tobe kiriye û bawerî bi Îsa Mesîh aniye.
8 Xwedê.
9 Welidiye.
10 An jî: Tên eşkere kirin, tên nas kirin.
11 Mizgîniya.

xwe ve dikerihe, qesas e[1]û hûn di-
zanin ku di tu qesasekî de jiyana
bêdawî, ya ku di xwe de disekine
nîne. 16 Em bi vêya, bi hezkirinê
ve dizanin, ji ber ku wî di oxra me
de canê xwe da; hewce ye ku em jî
di oxra birayên xwe de canên xwe
bidin. 17 Lê belê, her di kî de malê
dinê hebe[2] û birayê xwe di mota-
jiyê de bibîne û li dijî wî şewqata
xwe bigire, ma di wî de hezkirina
Xwedê dê çawa bimîne?
18 Ya zarokên min, em ne bi go-
tin û ziman, lê bi kar[3] û rastiyê hez
bikin! 19 Em ê bi vêya bizanibin
ku em ji rastiyê ne û li ber wî dilê
xwe aş bikin[4]; 20 ji ber ku ger dilê
me, me mehkûm bike, Xwedê ji
dilên me hîn jî mezintir e û her
tiştî dizane. 21 Ya xoşewîstno, ger
dilê me, me mehkûm meke, di hi-
zura Xwedê de dilawêriya me dibe
22 û em her çi bixwazin, em dê ji
wî bistînin; ji ber ku em bi emirên
wî ve digirin[5] û tiştên ku wî xoşnûd
dikin, çê dikin. 23 Û emirê wî ev
e: Mîna ku wî emir daye me, em
bi navê Lawê wî Îsa Mesîh bawe-
riyê bînin û ji hev û din hez bikin.
24 Û yê ku emirên wî digire di wî
de û ew jî di wî de dimîne. Û em
bi vêya, ji Ruhê ku wî[6] daye me,
dizanin ku ew di me de dimîne.

*Ruhan biceribînin*

5.Mûs 13,1-6; Met 24,4-5.11.24; 1.Yû 2,18-27; 2.Yû 7-11; 2.Sel 2,7-12

4 Ya xoşewîstno, bi her ruhî ve
bawer nebin; lê belê bona ku
hûn fêhm bikin, ka ew ji Xwe-
dê ne, wan biceribînin! Ji ber ku
gellek peyxamberên sexte belavî
dinê bûne. 2 Hûn ê bi vî awayî
Ruhê Xwedê nas bikin: Her ruhê
ku qebûl dike, Îsa Mesîh di be-
denê de hatiye[7], ew ji Xwedê ye.
3 Û her ruhê ku Îsa qebûl nake, ne
ji Xwedê ye û ruhê dijberê Mesîh
ev e; we hatina wî bihîstin û bi
rastî ew ji niha ve di dinê de ye.
4 Ya zarokno, hûn ji Xwedê ne û
we wan mexlûb kirin; ji ber ku yê
di we de ye, ji yê li dinê ye hîn jî
mezintir e. 5 Ew ji dinê ne; ji bo
vê yekê ji dinê ve dibêjin û dinya
guh dide wan. 6 Em ji Xwedê ne,
yê ku bi Xwedê dizanî, me guh-
darî dike; yê ku ne ji Xwedê ne,
guh nadin me. Ruhê rasteqîniyê û
ruhê rêşaşiyê em bi vêya dizanin!

*Xwedê hezkirin e*

1.Yû 3,11-24; Yû 3,16-17; Rom 5,5-8; Ef 5,1-2

7 Ya xoşewîstno, em ji hev û din
hez bikin! Ji ber ku hezkirin ji
Xwedê ye û her kesê ku hez dike

---

1 Mêrkuj, an jî: Kuştar.
2 Yanê dewlemend be.
3 Bi alîkarî.
4 Tetmîn bikin.
5 Em emirên wî tînin cîh.
6 Xwedê.
7 Di bedenê de hatiye dinê.

ji Xwedê ve bûyiye[1] û bi Xwedê
dizane. 8 Kesê ku hez nake, bi
Xwedê ve nizane; ji ber ku Xwe-
dê hezkirin e. 9 Hezkirina Xwedê
bi vêya ji me re hate nişan dayîn,
bona ku em bi navgîniya wî bijîn,
Xwedê Lawê xwe yê tekane şand
dinê. 10 Hezkirin di vê de ye, ne
ku me ji Xwedê ve hez kirin, lê
wî ji me hezkir û Lawê xwe ji bo
kefareta gunehên me şand. 11 Ya
xoşewîstno, ger Xwedê bi vî awayî
ji me hez kiriye, em jî deyndar in
ku ji hev û din hez bikin. 12 Qet
kesî Xwedê tu caran nedîtiye; ger
em ji hev û din hez bikin, Xwedê
di me de dimîne û hezkirina wî di
me de rayedar dibe.
13 Bi Ruhê xwe yî ku daye me, em
fêhm dikin ku em di wî de û ew jî di
me de dimîne. 14 Û me dîtin û em
şahdeyiyê dikin ku; Bav, Lawê xwe
ji bo Xelaskeriya dinê şand. 15 Her
kî mukir bête[2] ku Îsa Lawê Xwedê
ye, Xwedê di wî de û ew jî di Xwe-
dê de dimîne. 16 Û em hezkirina
Xwedê, ya bona me ye dizanin û
em bi wî bawer bûn. Xwedê hezki-
rin e û yê ku di hezkirinê de bimî-
ne, di Xwedê de dimîne û Xwedê
di wî de dimîne. 17 Bona ku di roja
daraziyê de dilawêriya me hebe,
hezkirin bi me, di vêya de, digihêje
kamiliyê; ji ber ku ew çawa be, em
jî li vê dinê ûsa ne. 18 Di hezkirinê
de tirs tune, lê hezkirina rayedar
tirsê davêje derve; ji ber ku di tirsê
de lêdan[3] heye û kesê ku ditirse, di
hezkirinê de nehatiye rayedar kirin.
19 Em ji wî hez dikin, ji ber ku wî
pêşiyê ji me hez kir. 20 Ger kesek
bibêje: Ez ji Xwedê hez dikim û ji
birayê xwe bikeribe, ew derewçîn
e; ji ber, ew kesê ku ji birayê xwe
yê ku dibîne hez nake, çawa dikare
Xwedayê ku wî nedîtiye, hez bike?
21 Û me vî emrî ji wî stendine, ku
dibêje: Kî ji Xwedê hez dike, bila ji
birayê xwe jî hez bike.

*Lawê Xwedê re bawerî anîn*

5 Her kesê ku bawer dike, Îsa
Mesîh e, ji Xwedê ve bûyiye[4]
û her kesê ku ji yê welidandiye
hez dike, ji yê ku ji wî bûyiye jî
hez dike. 2 Ger em ji Xwedê hez
bikin û emirên wî bînin cîh, bi vî
awayî em dizanin ku, em ji za-
rokên Xwedê hez dikin. 3 Ji ber,
hezkirina Xwedê ew e ku, em bi
emirên wî bigirin û emirên wî ne
giran in. 4 Ji ber, her kesê ku ji
Xwedê ve bûyiye[5], dinê mexlûb
dike û serfiraziya ku dinê mexlûb
kiriye ev e; yanê, baweriya me
ye. 5 Ma xeynî yê ku bawer dike
ku, Îsa Lawê Xwedê ye, kî dikare
dinê mexlûb bike?

---

1 Welidiye.
2 Qebûl bike.
3 Îşkence ye.
4 Welidiye.
5 Welidîne.

*Xwedê ji bo Lawê xwe şahdeyiyê dike*

6 Yê ku bi navgîniya avê û xwînê
ve hatiye Îsa Mesîh e; ew ne tenê
bi avê, lê bi avê û bi xwînê ve ha-
tiye. Û yê ku şahdeyiyê dike Ruh
e; ji ber ku Ruh rasteqînî ye. 7 Ji
ber ku, yên li ezman şahdeyiyê di-
kin sisê ne: Bavo, kelam û Ruhê
Pîroz û ev her sisiyan yek in
8 û yên ku li ser erdê şahdeyiyê
dikin sisê ne: Ruh, av û xwîn û
ev her sisiyan yek in. 9 Ger me
şahdeyiya mirovan qebûl kiribin;
şahdeyiya Xwedê hîn jî mezin
e; ji ber, şahdeyiya ku Xwedê di
derheqê Lawê xwe de kiriye ev e.
10 Yê ku bawerî bi Lawê Xwedê
bîne, di wî de şahdeyiya wî heye;
yê ku baweriyê bi Xwedê ve nîne,
wî ew kiriye derewçîn; ji ber ku
ew bi şahdeyiya ku Xwedê di
derheqê Lawê xwe de kiriye, ba-
wer nebûye. 11 Û şahdetî ev e ku:
Xwedê, jiyana abadîn daye me û
ev jiyan di Lawê wî de ye. 12 Di kî
de Law hebe, di wî de jiyan heye;
di kî de Lawê Xwedê tune be, di
wî de jiyan nîne.

*Jiyana abadîn*

13 Bona hûn bizanibin ku jiyana
we ya abadîn heye, ji we re, ji yên
ku bi navê Lawê Xwedê ve bawerî
anîne re, van tiştan nivîsandim û
bi vî awayî hûn (ji niha pê ve jî)
bi navê Lawê Xwedê bawer bikin.
14 Li ber wî ewlebûna me ev e ku;
ger li gor xwestina wî, em çi bi-
xwazin, ew dê me bibihîze. 15 Û
ger em bizanibin ku ew di xwesti-
na me yî her tiştî de me dibihîze,
em ê bizanibin ku xwestekên em
ji wî dixwazin, em distînin.
16 Ger kesek dibîne ku, birayê wî
gunehê nabe mirinê dike, dê bi-
xwaze[1] û ew[2] dê jiyanê bide yên ku
gunehê nabe mirinê kirine. Gunehê
ku dibe mirinê heye; ez nabêjim
ku bila di derheqê vî de rica bike.
17 Her neheqî guneh e; lê belê gu-
nehê ku nabe mirinê heye.
18 Em dizanin, her kesê ku ji
Xwedê ve bûyiye[3] gunehê nake;
lê belê yê ku ji Xwedê ve bûyiye,
bi xwe digire[4] û yê xerab nikare
dest bi wî de. 19 Em pê dizanin
ku, em ji Xwedê ne û hemûya dinê
di yê xerab de ye. 20 Lê belê em
dizanin ku, Lawê Xwedê hatiye
û bona em yê rasteqîn nas bikin,
fêhmkariyê daye me û em di yê
rasteqîn de, yanê, di Lawê wî de,
di Îsa Mesîh de ne. Xwedayê ras-
teqîn û jiyana abadîn ev e.
21 Ya zarokno, xwe ji seneman[5]
ve biparêzin! Amîn.

---

1 Bila ji bona wî dua bike.
2 Xwedê.
3 Welidiye.
4 An jî: Xwe diparêze.
5 Ji pûtan.

# NAMEYA YÛHENA YA DUWEMÎN

RASTÎ Û HEZKIRIN

*Pêşgotin*

Ev nameya ku şagirt Yûhena, di dema nivîsandina nameya yekemîn de nivîsandiye, bona civaka ku bi navê, 'Pîreka hatiye bijartin û zarokên wê' tê nasîn hatiye nivîsandin. Gotina, 'hezkirinê' çar cara, gotina 'rastiyê' pênc cara derbas dibe. Sedema nivîsandina vê nameyê, Civakê li hemberê hînkariyên xerabkir ve îkaz kirin û ji van hînkariyan ve parastin e (7,11).

Mirov dikare vê nameyê bi vî awayî kurt bike:

1. Tesîra rastiya Xwedê li ser bawerkiran 1-6
2. Xapînokiya li dinê 7-11
3. Bêrîkirina ji hevaltiya ruhanî 12,13

*Silav*

1 Ji kalepîr ve, ji pîreka ku hatiye
bijartin re û zarokên wê re, ya ku
di rasteqîniyê de ez jê hez dikim
û ne tenê ez, lê belê hemûyên ku
rasteqîniyê nas kirine jî, 2 ji ber
rasteqîniya ku di me de disekine
û dê abadîn bi me re be. 3 Bila ji
Bav Xwedê û ji Lawê Bav, Xudan
Îsa Mesîh ve, di rasteqîniyê û
hezkirinê de xêr, dilovanî û xweşî
bi we re be!

*Rastî û hezkirin*

3.Yû 3-4; Yû 13,34-35; 1.Yû 5,1-3

4 Gava min dît hinek zarokên te,
mîna ku me emir ji Bav girtine ew
ûsa di rêya rastiyê de diçin, ez bo
wê pirr kêfxweş bûm. 5 Û niha,
ya xanim, ne mîna ku ez emrekî
nû ji te re dinivîsînim, lê ya ku di
destpêkê de bi me re bû dinivîsînim
û ji te rica dikim: Em ji hev û
din hez bikin. 6 Û hezkirin ev e; li
gor emirên wî bimeşin. Mîna ku
we di destpêkê de bihîstin, bona
hûn di vê de bimeşin, emir ev e.

*Îkazên li dijî hînkariyên çewt*

1.Yû 4,1-5; 2,18-23; 2.Pêt 2,1-3

7 Ji ber ku, pirr kesên xapînokî
li dinê belav bûne; ew hatina Îsa
Mesîh di bedenê de qebûl nakin.
Yê ku xapînok û dijberê[1] Mesîh e,
ev e. 8 Li xwe miqate bin ku, bona

1 Dijî, zid, an jî: Hember.

hûn tiştên me ked dayinê winda
mekin, lê belê heqê xwe bêkêmasî
bistînin! 9 Hemû kesên ku pêş ve
diçin û di hînkariya Mesîh de na-
sekinin, di wan de Xwedê tune; yê
ku di vê hînkariya de disekine, di
wî de him Bav û him jî Law heye.
10 Ger dema kesek were cem we û
vê hînkariyê neanî be, wî kesî qe-
bûlî malê mekin û silavê nedin wî!
11 Ji ber ku yên silavê didin wî,
dibin şirîkê karên wî yî xerab.

*Xwestin û silav*

12 Hîn pirr tiştên ku ji we re bi-
nivîsim hene, min nexwest ku bi
kaxizê û hibirê[1] ve binivîsînim;
lê belê hêviya min ew e ku ez
werim cem we û bi we re rû bi rû
biaxifim; da ku, bila dilşayiya me
temam bibe. 13 Zarokên xwuşka
te ya ku hatiye bijartin, ji te re si-
lav dikin. Amîn.

1 Xibir, ximav, an jî: Murekeb.

# NAMEYA YÛHENA YA SÊWEMÎN

## MÊVANPERWERIYA DILSOZÊ MESÎH

*Pêşgotin*

Nameya sêwemîn ya şagirt Yûhena, di eynî demê de ji Gayos re hatiye nivîsandin. Wekî din mirov rastî navên Dîmîtriyos û Diyotrefîs dibe. Gayos dibe ku kesê navê wî di Nameya Romayiyan de derbas dibe be (16:23). Ew bi xwe birayek bawerkir (1,2), bawerkirek dilsozê rastiyê (3,4) û mêvan perwer e (5,6). Mîna bibe serokê Civaka bawerkiran bi zanîn e.

Diyotrefîs mirovek qure (9), di derheqê nûçevanan de çavnebar û zordest e. Pekandinek ji Nûçevan Yûhena ve li xwe heq dike (10). Lê li dijî wî, Dîmîtriyos, bawerkirek qenc û bi rûmet e (12).

Divê mirov destên xwe ji kesên ku Mizgîniya Xudan belav dike re vekin û ji rastiyê re xizmetê bikin (7,8). Diyotrefîs tenê bi qewirandina nûçevanan nema, ji kesên ku dixwazin wan qebûl bikin re jî astengiyê derxist. Nivîs, bi bêrîkirina ji hevaltiya ruhanî ve diqede (13,14).

*Destpêk û silav*

1 Ji kalepîr ve, ji yê ku ez di raste-
qîniyê de jê hez dikim, ji Gayosê
xoşewîst re!
2 Ya xoşewîst, çawa ku canê te di
xweşiyê de ye, ez dixwazim ku[1],
tu di her tiştî de di nav tenduristî
û xweşiyê de bî! 3 Ji ber ku dema
birayan hatin; van şahdeyî kirin
û gotin ku, tu di riya rastiyê de
dimeşî û li cem rastiyê mayî, ez
pirr kêfxweş bûm. 4 Ji ber vêya,
xeynî ji bihîstina meşa zarokên
min, ya di rastiyê de, kêfxweşiyek
minî mezintir nîne

*Pesnahî û şîret*

5 Ya xoşewîst, ji birayan re û
tevî vêya ji xerîban re her tu çi
dikî, xebatên dilsoz û ji dil dikî;
6 wana li ber Dêrê[2] ji hezkirina te
re şahdeyiyê kirin. Gava tu wana
bi mîna liyaq bûna Xwedê ve
bişînî, tuyê qenc bikî. 7 Ji ber ku
ji Neteweyan[3] tiştekî nestendin û
di oxra Nav de derketin. 8 Niha,

---

1 Dua dikim ku.
2 Di hizûra Civaka bawerkiran de.
3 Ji yên ku baweriyê nîn in ve.

bona ku em di oxra rastiyê de
bibin kedkar, em deyndar in ku
kesên ûsa qenc qebûl bikin.

*Di Civakê de serokê sexte*

Marq 9,35; Lûq 20,46-47; Fîl 2,3; 1.Pêt 5,3

9 Min ji Dêrê re hinek tişt nivî-
sand, lê belê di nav wan de, yê
ku aşiqê meqama herî bilind e,
Diyotrefîs me qebûl nake. 10 Ji
ber vê yekê, ger ez werim, ez ê
karên wî yên li dijî me bi gotinên
xerab û bi îftirayê kirine di bîr de
bînim û bi vêya nasekine, ew bi
xwe birayan jî qebûl nake û ji yên
dixwazin re jî astengiyê derdixe û
wan ji Dêrê ve davêje derve.
11 Ya xoşewîst, ne xerabiyê, lê
qenciyê ji xwe re bike mînak. Yê
ku qenciyê dike, ji Xwedê ye; yê
ku xerabiyê dike, wî Xwedê ne-
dîtiye. 12 Ji aliyê her kesî ve û
bi xwe ji aliyê rasteqîniyê ve jî
Dîmîtriyos re şahdeyî tête kirin û
em jî şahdeyiyê dikin û tu dizanî
ku şahdeyiya me rasteqîn e.
13 Gellek tiştên min yê ku ji te re
binivîsînim hene, lê belê naxwa-
zim ku bi hibirê[1] û pênûskê ve bi-
nivîsim. 14 Lê belê ez hêvîdar im
ku di nêzîk de ez ê te bibînim û em
ê rû bi rû biaxifin. Bila xweşî ji te
re be! Heval silavê li te dikin. Ji
hevalan re bi nav û nav silav bike!

---

1 Xibir, ximav, an jî: Murekeb.

# NAMEYA CIHÛDA

## ÎKAZKIRINA LI HEMBERÊ MAMOSTEYÊN XERAB

*Pêşgotin*

Nivîskarê vê nameyê Cihûdayê Birayê Aqûp e (binêrin Marq. 6:3; N.Galatiyan 1:19; K.Şa. 1:14). Naveroka nameyê mîna Nameya Pêtrûs ya duwemîn e.

Ev nameya ku Civaka bawerkiran, di derheqê mamosteyên xerab de îkaz dike, têkiliyên neqenc û civakê bijahr dike, dide xuya kirin (3,4), ji bêbaweriya wan jî tê qal kirin (5,7).

Taybetiyên bêbaweran, mîna bêbawerên berê ne (8-16). Hatina vana, hatibû daxuyanî kirin (17-19). Divê li hemberê wan têkiliyên bawerkiran çawa be (20-23)? Name bona bawerkiran, bi xwestina pîroziyê ve diqede 24,25).

*Destpêk*

1 Ji Cihûdayê ku qûlê Îsa Mesîh û
birayê Aqûp, ji bangkirên ji aliyê
Bavo Xwedê ve hatine hez kirin û
di Îsa Mesîh de hatine parastin re:
2 Bila dilovanî, dilxweşî û hezki-
rin ji we re zêde bibe!

*Guneh û darazî*

3 Ya xoşewîstno, dema gellekî
xîret dikirim ku, ez ji we re di
derheqê pev re xelas bûna me de
binivîsînim; bi gotina rica kiri-
na; hûn bona baweriya ku carekê
ji pîrozan re hatiye emanet kirin
têkoşînê bikin, ez hewcedar bûm
ku ji we re binivîsînim.

*Daraziya Xwedê li dijî bêxwedêyan*

2.Pêt 2,1-9; K.Şa 20,29-30; 2.Kor 11,3-15; Pey 2,14-15; 2,20-23

4 Ji ber ku hin kesên bêxwedê,
yên ku xêra Xwedayê me ji se-
fahetê re dikin navdîtî û yek fer-
mandarê[1] me û Xudanê me Îsa
Mesîh înkar dikin, bi dizîka ketin
nav we; darazbûna wan ji zû ve[2]
hatiye nivîsandin.
5 Hûn vana hemûyan dizanin jî,
lê dîsa dixwazim bînim bîra we
ku, Xudan gelê xwe pêşiyê ji
welatê Misirê xelas kir; lê belê
dawiyê yên ku baweriyê neanîne
helaq kir. 6 Û wî[3], milyaketên di
nava sînorên rayedariyên xwe de

---

1 Efendî, hikumdar.
2 Ji berê ve.
3 Xudan.

nemane û ji cîhê ku ji wan re ha-
tiye danîn cuda bûne, bona roja
mezin ya daraziyê, bi zincîrên
ku venabin ve girê da û hepsî ta-
riyê kir. 7 Sodom, Gomora û ba-
jarê li dora wan in jî bi awayekî
wekhev xwe radestî teqînên fuhş
û rêçewtiyê kirin. Ev bajarê ku
heta bêdawîbûnê cezaya di agir
de şewitînê dikişînin, her yek
mînakên ders jê girtinê ne.

*Tevgera mamosteyên sexte*

2.Pêt 2,10-22; 2.Tîm 3,1-9.13;
Tît 1,10-16

8 Lê belê vana jî bi eynî awayî
xeyalan dikin û bedenê gemarî
dikin û rayedariyê bi tunehiyê
dihesibînin û ji mezinîhayiyan[1]
re kufir dikin. 9 Lê belê heta
sermilyaket Mikaîl jî, dema di
derheqê cesedê Mûsa de bi Îblîs
re têkoşerê dikir, newêriya ku
bi kufir kirinê wî daraz bike; lê
got: Bila Xudan bi te bipeke!
10 Lê belê vana, ji heçî tiştên ji
wê fêhm nakin re xeberan didin
û mîna heywanên bêvac di fêhm-
kirina tiştên xweza[2] de dê helaq
bibin[3]. 11 Wey li wan! Ji ber ku
di rêya Kayîn de çûn û bona qe-
zencê ketin rêşaşiya Balam û di
serîhildana Korah de helaq bûn!
12 Dema vana, di ziyafetên we
yî hezkirinê de, bi we re bixwin
û vexwin, leke ne, şivanên ku
bêtirs xwe xwedî dikin in; ewrên
bê baran yên bi ber ba ve diçin,
darên payîzê yên bêmêw, yên ji
rehê ve hatine kişandin û du ca-
ran mirî ne; 13 şepêlên har yên
behrê, yên şermezariyên xwe be-
lav dikin in; mîna stêrkên bere-
dayî ne; tariyek heta bêdawîbûnê
bidome li benda wan e.

14 Henoxê paşî Adem ji nifşeya
heftemîn e, ji vana re jî peyxam-
beritiyê kir û got: 15 Bona li dijî
her kesî cîh anîna daraziyê û di
derheqê hemû karên wanî bê-
xwedê de, yên ku bi bêxwedêtiyê
dikin û bona hemû tiştên tund yên
ku gunehkarên bêxwedê li dijî wî
gotine, bona hemû rêşaşan bêdeng
bike, a vay, Xudan bi deh hezarên
pîrozên xwe re hat. 16 Vana yên
di berxwe de dibêjin û gazinca
dikin; li pey şehwetên xwe diçin
in û devê wan gotinên tûmtûrak
dibêjin; yên ku bona qezencê[4]
hurmetê ji şexsan re dikin in.

17 Lê belê hûn, ya xoşewîstno,
gotinên ku ji berê ve ji aliyê
şagirtên Xudanê me Îsa Mesîh ve
hatine gotin di bîr de bînin; 18 ku
ji we re: Yên ku di dema dawîn
de kêfê dikin, dê yên bêxwedê û
li gor şehweta xwe dimeşin bibin,

1 Ji afirên bilind re.
2 Siruşt, an jî: Tabîet.
3 An jî: Çi heye ku bi tabîeta xwe fêhm kirine, wan dibe têkçûnê.
4 Menfîet.

digotin. 19 Vana yên ku cihêtiyê
dikin, bi hebûna mirov ve girêdayî
û kesên ku di wan de Ruh tune ne.
20 Lê belê hûn, ya xoşewîstno,
xwe li ser bingeha baweriya xwe
ya herî pîroz e ava bikin; di Ruhê
Pîroz de dua bikin; 21 dema hûn
li benda dilovaniya Xudanê me
Îsa Mesîh ya we bigihînî jiyana
abadîn bin, xwe di hezkirina Xwe-
dê de biparêzin. 22 Û dilovaniyê li
hin kesên bêqirar re bikin; 23 hin
kesan ji agir ve bikişînin û xelas
bikin û ji hin kesan re jî bi tirsê
dilovaniyê bikin û ji kincekî bi
bedena biguneh ve hatiye gemar
kirin jî bikerihin.
24 Niha, ji Xelaskerê me Xwe-
dê yê yek e, yê ku hêza wî têra
we ji ketinê ve biparêze û we bi
kêfxweşiyek mezin û bêleke der-
xe hizûra xwe, heye re, 25 bi nav-
gîniya Xudanê me Îsa Mesîh, berî
hemû çaxan û niha û heta hemû
çaxan bila bilindahî, rewnaqî, ser-
werî û qudret bibe! Amîn.

# PEYXAMA JI XWEDÊ VE HATIYE YÛHENA

SERDESTIYA BERXIKÊ

*Pêşgotin*

Nivîsa Kitêba Pîroz ya dawîn, di derheqê Eskatologyayê (dawiya deman) de ye. Gellek wekok, nîşandan û danasînên ku xwendevanê hemdem bifikirîne tê de hene. Ev tiştên ku îro fêhmkirina wan dijwar e, di dema nivîsandina Kitêbê de zehf hêsan bû.
Kesê ku di dawiya sedsala yekemîn de vê nivîsa nivîsandiye, xwe bi navê Yûhena ve dide nasîn. Xwedê naveroka vê daxuyanîkirina ezmanî, da Îsa Mesîh. Wî jî bi navdîtiya milyaketekî xwe vêya ji xulamê xwe Yûhena re şand (1:1,2). Babet, di derheqê bûyerên di demekê kurt de dê bibine de yî. Ji ber ku di derheqê dawiya deman de ye, ji vêya re nivîsa Eskatologya tê gotin.
Ev nivîsa, bi heft belavokên ku Mesîh vejiyaye û çûye ezman dide milyaketê serokê Civakên heft Dêrên li Enedolê ne dest pê dike. (Pênc heb îkaz, dudu jî pesnahî). Paşî vêya xwendevan xewn û xeyalên di derheqê Berxik û Xwedê de (4:1-5:14), paşî wê rastî heft moran û di vebûna vana de jî rastî heft xewn û xeyalan dibe (6:1-8:1).
Paşî vana dengê heft boriyan û heft xewn û xeyal li pêy tên (8:2-9:21; 11:15-19). Di navbera vekirina morên şeşemîn û heftemîn de rewşekê din çêdibe (7:1-17; 10:1-11:14). Paşî vêya Yûhena, li ezmanan rastî xewn û xeyalekî sereta tê (12:1-8). Sê cenawirên li hemberê Xwedê şer dikin (12:9-13; 1:18). Li Çiyayê Siyonê Berxik û dilsozên wî (14:1-20), heft milyaketên heft tasên zêrînî girtine (15:1-16:21) li pêy vana tên.
Paşê darazkirinên din tên (17:1-19:21). Dema Kitêb bi serdestiya Berxikê ve dawî dibe, Serweriya Mesîh ya hezar salî û ezmanê nû, erdê nû û Orşelîma nû xuya dibe (20:1-22:21).

*Peyxama Îsa Mesîh*

1 Peyxama Îsa Mesîh e. Vêya, Xwedê, bona ku bûyerên dê di dema nêzîk de çê bibin nîşanî qûlên xwe bide, da wî û ew, bi navgîniya milyaketê xwe şand û wê

nîşanî qûlê xwe Yûhena da; 2 wî
jî li gotina Xwedê û li şahdeyiya
Îsa Mesîh, yanê, li hemûya tiştên
ku dîtiye, şahdeyiyê kir. 3 Xwezî
li kesên ku gotinên vê peyxamber-
tiyê dixwînin û guhdarî dikin û bi
tiştên ku di wê de hatine nivîsan-
din digirin! Ji ber ku dem nêzîk e.

*Nameyên ji heft Dêrên li herêma Asyayê ne re û ji heft Dêran re silav*

4 Ji Yûhena ve, ji heft Dêrên li
Asyayê ne re: Bila ji Mesîh Îsa, yê
ku hebû û dê hebe û dê were û ji yê
heft ruhê ku li ber texta wî ne û ji
şahdeyê dilsoz 5 û ji miriyan pêşiyê
welidiye û serokê qiralên dinê ye
ve, xêr û xweşî ji we re be! Ji yê ku
ji me hez kiriye[1] û di xwîna xwe de
me ji gunehên me ve şuştiye 6 û ji
yê ku, me ji Bavê xwe Xwedê re
kiriye qiralan û kahînan re, ji heta
bi abadîna abadînan ve bilindahî û
qudret bibe! Amîn.
7 A vay, bi ewran ve tê û dê her
çav û yên bedena wî qul kirine
jî wî bibînin û bona wî dê hemû
neteweyên rûyê erdê li xwe bixin!
Belê, Amîn.
8 Xudan, Xwedayê ku hêza wî têra
her tiştên hene, hebûn û dê hebin
dike, dibêje: Alfa û Omega[2] ez im.
9 Ez, yê ku tevî we pardarê ten-
gasî û milyaket û sebra di Îsa de
ye, birayê we Yûhena, bona go-
tina Xwedê û şahdeyiya Îsa, li gi-
rava ku navê wê Patmos e, bûm.
10 Di roja Xudan de, ez di Ruh
de bûm û li paşî xwe dengekî
bilindî mîna borîjenê bihîstim:
11 Dîtinên xwe li kitêbekê binivî-
se û ji heft Dêrên ku li Asyayê ne
re bişîne: Ji Efesê re, ji Îzmîrê re,
ji Bergamayê re, ji Tiyatêrayê re,
ji Sardisê re, ji Fîladelfiyayê re û
ji Lawdîkyayê re! digot.
12 Û bona ez dengê ku bi min re
diaxife bibînim, vegeriyam paş
xwe û gava vegeriyam, min heft
şimadankên[3] zêrîn 13 û di nava
şimadankan de, yekî mîna lawê
mirov, kincên li ser wî digihêje
lingên wî û sînga wî bi şûtika
zêrînî ve hatiye pêçandin dîtim.
14 Û serê wî û porê wî sipî, mîna
hiriyê sipî, mîna berfê bû û ça-
vên wî mîna pêtê agir bûn! 15 Û
lingên wî mîna tûncê dibiriqî yê di
firnê de bûye pêtî bû û dengê wî
mîna dengê pirr avan bû. 16 Û di
destê wî yê rastê de heft sitêrk he-
bûn û ji devê wî şûrekî du devî yê
tûj derdiket û wecê wî mîna roja
bi hemû hêza xwe ve dibiriqe bû.
17 Û dema min wî dît, ez mîna mi-
riya li ber lingên wî ketim. Û wî
destê xwe yî rastê danî ser min û
got: Metirse! Yê pêşîn û yê dawîn

---

[1] Ji Îsa Mesîh re.
[2] Binihêre; birr 21:6
[3] Şamdank, mûmdank.

18 û yê zindî ez im û ez miribûm
û a vay, ez bi abadîna abadînan[1] ve
zindî me û kilîdên[2] mirinê û warê
miriyan bi min re ne. 19 Niha tiştên
ku te dîtine, yên ku niha bibin û
yên ku ji piştî vêya ve dê bibin bi-
nivîsîne. 20 Raza[3] van heft stêrkan
yên ku te di destê minî rastê de
dît û heft şimadankên zêrînî, heft
sitêrk milyaketên heft Dêran[4] in û
heft şimadank jî heft Dêr in.

*Ji Dêra li Efesê ye re*

5.Mûs 6,4-15; 2.Kor 11,2-3

2 Ji milyaketê Dêra li Efesê ye re
binivîsîne: Yê ku heft sitêrkî di
destê xwe yî rastê de digre, di nava
heft şimadankên[5] zêrînî de dimeşe,
ûsa dibêje: 2 Ez bi karên te û bi xe-
batkariya te û bi sebra te dizanim û
ez dizanim ku tu nikarî ji xeraban
re sebir bikî û te yên ku ne şagirt
in, lê belê xwe bi şagirtî didin nasîn
ceriband û wan derewçîn dît 3 û tu
bisebr î û di oxra navê min de, te li
berxwe da û newestiyayî. 4 Lê belê
tiştekî minî li dijî te heye: Te hez-
kirina xwe yî pêşîn berda. 5 Niha
di bîr de bîne ku tu ji ku ket û tobe
bike û karên xwe yî pêşîn bike!
Ger tu tobe neke, ez ê bêm te û
şimadanka te ji cîh ve rakim! 6 Lê
belê ev di te de heye ku: Tu ji karên
alîgirên Nîkolas ve dikerihe; ez jî ji
wan dikerihim. 7 Yê guhê wî hebe,
bila bibihîze ku ka Ruh ji Dêran re
çi dibêje! Ez ê mafê xwarina ji dara
jiyanê ya di bihuşta[6] Xwedê de ye,
bidim yê ku serdest bê.

*Ji Dêra li Îzmîrê ye re*

Met 5,10-12; 10,22.39; Aqûp 1,12;
1.Pêt 3,12-14

8 Û ji milyaketê Dêra li Îzmîrê ye re
binivîsîne: Yê miriye û dîsa rabûye,
yê ku pêşîn û dawîn e ûsa dibêje:
9 Ez tengasiya te û xizaniya te
dizanim; – lê belê tu dewlemend
î! – Û ez kufrên kesên ji xwe re
dibêjin Cihûd, lê belê yên ne Cihûd
in, di mîna keniştа Îblîs de ne dikin
dizanim. 10 Ji tengasiyên ku tu li
ber kişandinê ye metirse! A vay,
Îblîs bona ku hûn bên ceribandin,
dê ji we hin kesan bavêje zîndanê û
dê deh roj tengasiya we hebe. Heta
mirinê dilsoz be û ez ê taca jiyanê
bidim te! 11 Yê guhê wî hebe, bila
bibihîze ku ka Ruh ji Dêran re çi
dibêje! Yê ku serdest bê, dê ji miri-
na duwemîn ve xesarê[7] nebîne.

*Ji Dêra li Bergamayê ye re*

Cihû 3,11; 2.Yû 7-11; Pey 2,20-23

12 Û ji milyaketê Dêra li Berga-
mayê ye re binivîsîne: 13 Yê ku

1 Heta bêdawiyan.
2 An jî: Mifteyên.
3 An jî: Sir.
4 Civaka bawerkiran.
5 Mûmdank, Şamdank.
6 Cenet.
7 Zirarê, ziyanê.

xwediyê şûrê tûj yê bi dudevî ye,
van tiştan dibêje: Ez bi karên te û
ka tu li ku derê rûdinî ve dizanim;
texta Îblîs li wir e û tu bi şidandî
bi navê min ve digirî û di nava
we de, li cîhê ku Îblîs lê rûdinî, di
rojên kuştina şahdeyê minî dilsoz
Antîpa de jî, te baweriya xwe ya
bi min ve înkar nekir. 14 Lê belê li
dijî te çend tiştên min hene; ji ber,
li wê derê, yên te, ên ku bi hînkari-
ya Balam ve girêdayî mane hene;
wî, bona xwarina goştên ji pûtan
re hatiye pêşkêş kirin û bona zinê[1]
bikin, tilpekî avêtina ber lawên Îs-
raêl, hînî Balak kir. 15 Mîna vêya,
yên te, ên ku bi fêrkirina Nîkolas,
ya ku ez jê dikerihim ve digirin jî
hene. 16 Niha tobe bike! Ya na, ez
ê zû werim te û li dijî wan bi şûrê
di devê xwe de ve cengê bikim.
17 Yê guhê wî hebe, bila bibihîze
ku ka Ruh ji Dêran re çi dibêje!
Ez ê ji manna[2] veşartî bidim yê
ku serdest bê û ez ê kevirekî sipî
bidim wî û li ser kevir, navekî nû
xeynî yê ku distîne kes nizanibe
hatiye nivîsîn.

*Ji Dêra li Tîyatêrayê ye re*

1.Yû 4,1-6; 2.Kor 11,3-4;
2.Pêt 2,1-22; 2.Qir 9

18 Û ji milyaketê Dêra li Ti-
yatîrayê ye re binivîsîne: Lawê
Xwedê, yê kû çavên wî yên
mîna pêtê agir heye û lingên wî
mîna tûncê dibiriqe ne, van tiştan
dibêje: 19 Ez karên te û hezkirin
û baweriya te û xizmeta te û sebra
te dizanim û ez dizanim ku karên
te yî dawîn, ji karên te yî pêşîn
hîn jî zêdetir in. 20 Lê belê li dijî
te tiştekî min heye; tu li pîreka bi
navê Îzabêl, ya ku ji xwe re pey-
xamber dibêje bi xweşdîtinê di-
nihêrî û ew bi hînkariya xwe qûlên
min ji rê ve derdixe û ber bi zîna
kirinê û xwarina goştên ji pûtan re
hatine pêşkêş kirin ve dibe. 21 Û
bona tobe kirina wê, min demekê
da wê û naxwaze ku ji zîna[3] xwe
ve tobe bike. 22 A vay, ez ê wê
bavêjim nav livînekî û yê bi wê re
zîna kirine jî, ger ji karên ku wê
kiriye tobe nekin, ez ê bavêjim
nav tengasiyên mezin. 23 Û ez ê
zarokên wê, bi mirinê ve bikujim
û dê hemû Dêr bizanibin, yê ku
lêkolînê li gurçik û dilan dike, ez
im. Û ez ê li gor karên we her yekî
bidim we.
24 Lê belê ji we re, ji yên dinî li
Tiyatîrayê ne re, ji hemûyên ku di
wan de ev hînkariya nîne re, mîna
ku ew dibêjin, ji yên tiştên Îblîs ên
kûr ve nizanin re, dibêjim: Xeynî
vêya ez tu barî danaynim ser we.
25 Lê belê heta ku ez bêm, bi yê

---

1 Bêexlaqiyên cinsî.
2 (2.Mûsa 16:33)
3 Fuhûş.

ku bi we re ye bi pihêtî[1] ve bigi-
rin[2]! 26 Û yê ku bi ser bikeve û
heta dawîn bi karên min ve bigire,
ez jî ji Bavê xwe çawa girtibim,
ez ê li ser neteweyan ve serweriyê
bidim wî.
27 Mîna ku qabên kûzker dişkê-
nin, dê ew ê wan bi doqê hesinî
ve bajo 28 û ez ê stêrka sibehê bi-
dim wî. 29 Yê guhê wî hebe, bila
bibihîze ku ka Ruh ji Dêran re çi
dibêje!

*Ji Dêra li Sardisê ye re*

Aqûp 2,14-26; Met 7,21-23; 24,42-51

3 Û ji milyaketê Dêra li Sardisê
ye re binivîsîne: Yê ku tê de
heft Ruhê Xwedê û heft sitêrk
hene, ûsa dibêje: Ez bi karên te
dizanim; te bi jiyînê ve nav kiriye
û tu mirî yî. 2 Hişyar bibe û tiştên
li paş ve mayîne û li ber mirinê ne
xurt bike! Ji ber ku min li ber Xwe-
dayê xwe, karên te temambûyî ne-
dîtin. 3 Niha, di bîra xwe de bîne
ku, ka te çawa girtiye û bihîstiye
û pê bigire û tobe bike! Niha, ger
tu ne hişyar be, ez ê mîna dizekî
werim ser te û tuyê nizanibe ku ez
ê di kîjan saetê de bêm ser te. 4 Lê
belê li Sardisê çend kesên te hene
ku, wan kincên xwe gemarî nekiri-
ne û ew ê bi min re di nava kincên
sipî de bimeşin; ji ber ku liyaq in.
5 Yê ku serdest bê, dê bi vî awayî
kincên sipî li xwe bike û ez navê
wî ji kitêba jiyanê ve betal nakim[3]
û ez ê li berya Bavê xwe û milya-
ketên wî navê wî kesî mukir bêm[4].
6 Yê guhê wî hebe, bila bibihîze
ku ka Ruh ji Dêran re çi dibêje!

*Ji Dêra li Fîladelfiyayê ye re*

Yû 14,23; 2.Pêt 2,9; 1,10-11

7 Û ji milyaketê Dêra li Fîladel-
fiyayê ye re binivîsîne: Yê pîroz
û rast e, yê xwediyê qufleya Da-
wid e, yê ku vedike û kes nikare
bigire û digire û kes nikare veke,
ûsa dibêje: 8 Ez bi karên te diza-
nim. A vay, min deriyek vekirî ku
tu kes nikare bigire danî ber te; ji
ber ku hinek hêza te heye û te bi
gotina min girt[5] û te navê min în-
kar nekir. 9 A vay, ez hin kesên
ji kenişta Îblîs, yên çawa ku ne
Cihûd in, lê bi derewan ji xwe re
dibêjin em Cihûd in, didim; a vay,
ez ê wan ûsa bikim ku dê werin û
li ber lingên te secde bikin û dê
bizanibin ku ez ji te hez dikim.
10 Madem ku te bi gotina sebra
min ve girt, ez ê jî ji saeta ceriban-
dinê ya ku bona kesên li rûyê erdê
dijîn biceribîne bê ser hemûya
dinê, te biparêzim. 11 A vay, ez
zû têm; bona ku tu kes taca te ji
te negire, bi ya ku tu xwediye bi

1 Bi şidandi.
2 An jî: Dilsoz bimînin.
3 An jî: Jê dernaxim.
4 Îqrar bikim.
5 Te li gor gotina min kir, an jî: Tu li pey gotina min çû.

hijdîn[1] pê bigire! 12 Ez ê yê ku
serdest bê, di Perestgeha Xwe-
dayê xwe de bikim stûnekî û ew
dê êdî dernekeve derve û ez ê li
ser wî navê Xwedayê xwe û navê
bajarê Xwedayê xwe, ya ji Xwe-
dayê min, ji ezman ve daketiye,
navê Orşelîma nû û navê xwe yî
nû binivîsînim. 13 Yê guhê wî
hebe, bila bibihîze ku ka Ruh ji
Dêran re çi dibêje!

*Ji Dêra Lawdîkyayê ye re*

Lûq 14,34-35; 2.Tîm 3,1-5

14 Û ji milyaketê Dêra li Lawdîk-
yayê ye re binivîsîne: Yê Amîn,
dilsoz û şahdeyê rasteqîn, çav-
kaniya[2] afirandina Xwedê ûsa
dibêje: 15 Ez bi karên te dizanim,
tu ne sar î, ne jî germ. Xwezîka
tu sar an jî germ bûya! 16 Bi vî
awayî ji ber ku tu ne germ î ne
jî sar, lê bona ku tu sarogermî[3]
yî; ez ê te ji devê xwe verşînim.
17 Ji ber ku tu dibêjî, ez dewle-
mend im û ez dewlemend bûm û
motajiya min ji tu tiştî re nemaye!
Û tu nizanî ku tu reben û di rewşekî
heyfînî û xizan û kor û tazî de yî.
18 Bona ku tu bibî dewlemend,
zêrê bi agir ve hatiye safî kirin û
bona ku tu li xwe bikî û şerma ta-
zîbûna te xuyanî nebe, kincê sipî û
bona ku tu bibînî, ji bo tu di çavên
xwe de bidî ji min stendina mer-
hema çavan, ez ji te re şîret didim!
19 Ez bi hemû hezkirê xwe ve di-
pekim û perwerde dikim. Niha, bi
vî awayî were xîretê û tobe bike!
20 A vay, ez li ber derî sekinî me û
li derî dixim; ger kesek dengê min
bibihîze û derî veke, ez ê têkevim
cem wî û ez bi wî re û ew jî bi min
re, em ê bi hev re şîvê[4] bixwin.
21 Ez çawa bi serdestî hatina xwe û
bi Bavê xwe re li texta wî rûniştim,
ez ê jî mafê bi min re, li texta min
rûniştinê bidim yê ku serdest bê.
22 Yê guhê wî hebe, bila bibihîze
ku ka Ruh ji Dêran re çi dibêje!

*Roja mezin tê daxuyanî kirin*

*Texta li ezman*

Îşa 6,1-3; Hêz 1

4 Paşî van tiştan dîtim û a vay,
li ezman deriyek vekirî hebû û
axaftina wî yî bi min re bihîstibûm
û dengê pêşîn yê mîna borîjenê bû
got. Derkeve vir û ez ê bûyerên li
pey vêya lazim e ku bibin, nîşanî
te bidim! 2 Û ez hema di Ruh de
bûm û a vay, li ezman textekî û
yekî li ser wî textî rûniştiye hebû.
3 Û yê li ser rûniştibû, mîna xuya-
niya eqîqa yeşîm û sor bû û kes-
kesorekê zumridê di bîr de dianî li
dora text girtîbû. 4 Û li dora text
bîst û çar text û li ser textan rûniştî

---

1 An jî: Pêt.
2 An jî: Destpêka.
3 Çêrme.
4 Xwarin, an jî: Xwarina êvarê.

bîst û çar kalepîrên li ser serê wan
tacên zêrîn û kincên sipî li xwe
kirî, hebûn. 5 Û ji text ve birûsk û
deng û gurmîniyên ezman derdi-
ketin. Û li ber text, heft pêtaleyên[1]
dişewitin hebûn; ew heft Ruhê
Xwedê ne. 6 Û li ber text behrekî
mîna billûrê, wekî ji camê[2] hebû û
di nav text û dora wê de, çar afirên[3]
zindî, yên pêşî û paşiyên wan bi
çavan ve tijî ye hebûn. 7 Û afirê
zindî yê yekemîn, mîna şêrekî bû
û afirê zindî yê duwemîn, mîna
cangeyekî bû û wecê afirê zindî
yê sêwemîn, mîna wecê mirovekî
bû û afirê zindî yê çaremîn, mîna
qertelekî difire bû. 8 Û ji her yekê
ji van çar afirên zindî xwediyê
heft bazikî bûn û her alî û hundirê
wan bi çavan ve tijî bûn û bi roj
û şev, bêsekin û bêrawestin ûsa
dibêjin: Pîroz, pîroz, pîroz e, Xu-
dan Xwedayê ku şiyandarê her
tiştî ye, yê ku hebû û yê ku heye û
yê ku dê were!
9 Û afirên zindî, her ku ji yê li ser
text rûniştiye, yê ku dê bi abadî-
na abadînan ve bijî re bilindahî
û birêzî û şikiryê pêşkêşî dikirin,
10 bîst û çar kalepîr, li ber yê
heta bêdawiyan bijî û li ser text
rûniştiye xwe davêtin erdê ber wî
û bi wî diperistin û tacên xwe da-
vêjin ber text û dibêjin:
11 Ya Xudanê me û Xwedayê me!
Tu liyaqî girtina bilindahiyê û
birêziyê û qudretê yî.
Ji ber ku te hemû tiştan afirand û
ew bi xwestina te hebûn û hatin
afirandin!

*Berxik û Kitêba bi mohr kirin*

Pey 1,5-6; 7,9-12

5 Û min di destê rastê yê ku li
ser text rûniştiye de kitêbek
ji hundir û ji derve[4] hatiye nivî-
sandin û bi heft mohran ve hatiye
mohr kirin dît. 2 Û min milyake-
tekî xurt bi dengek bilind dibêje:
Kî liyaqî vekirina kitêbê û mohr-
an e? dît. 3 Û ne li ezman û ne
li rûyê erdê û ne jî li binê erdê tu
kesê ku kitêbê veke û li hundirê
wê binihêre tunebû. 4 Û ez zehf
digiriyam; ji ber ku tu kesê liyaqî
kitêbê veke û li hûndirê wê bi-
nihêre nehat dîtin.
5 Û yekî ji kalepîran ji min re got:
Megrî! A vay, Şêrê ji eşîra Cihû-
da ve ye, reha Dawid, di vekirina
kitêbê û heft mohrên wê de ser-
dest hat[5]!
6 Û di nava text û çar afirên zin-
dî de û di nava kalepîran de, min
Berxikekî mîna ku hatibe serjêki-
rin sekiniye dît; heft qiloç û heft
çavên wî hebûn; vana heft Ruhê
Xwedê yê ku ji hemûya dinê re

1 Meşaleyê.
2 Wekî ji camê çê bûbe.
3 Mexlûqên.
4 Ji hundir û paşê ve, an jî: Ji her du alî ve.
5 An jî: Bi ser ve ket.

hatine şandin in. 7 Û hat û ji des-
tê rastê yê li ser text ve rûniştiye
kitêbê girt. 8 Û dema wê girt, çar
afirên zindî û bîst û çar kalepîr li
ber Berxikê, bi erdê ve secde ki-
rin û di destê her yekî de çenkek[1]
û wekî tasên zêrînî yên bi buxurê
ve tijî, yên ku duayên pîrozan in;
hebûn. 9 Û wan bi sitrandina qesî-
deyek nû digotin:
Tu liyaqî girtina kitêbê û vekiri-
na mohrên wê yî; ji ber ku tu hatî
serjêkirin û te mirovên ji her eşîrî
û ji her zimanî û ji her gelî û ji
her neteweyî bi xwîna xwe ve ji
bona Xwedê kirîn 10 û te, wan di
xizmeta Xwadayê me de kir qira-
liyet û kahînan û ew dê li ser dinê
serweriyê bajon[3]!
11 Û li dora text û afirên zindî û
kalepîran ve min gellek milya-
ketan dît û dengên wan bihîst û
hejmara wan bi hezaran hezar,
bi dehhezaran dehhezar bû; 12 bi
dengekî bilind digotin:
Berxê ku hatiye serjêkirin, liyaqî
girtina qudretê û dewlemendiyê û
hîkmetê û hêzê û birêziyê û bilin-
dahiyê û pesnahiyê ye!
13 Û min bihîst ku hemû afirên li
ezman û li rûyê erdê û li binê erdê
û li ser behrê ne û hemû tiştên ku
di wan de ne digotin: Pesnahî û
hurmet û bilindahî û qudret heta
abadîna abadînan, bila ya yê li ser
text ve rûniştiye û ya Berxikê be!
14 Û çar afirên zindî gotin: Amîn!
Û bîst û çar kalepîr bi erdê ve
secde kirin û ji yê heta abadîna
abadînan dijî re peristin.

*Berxik heft mohran vedike*

6 Û min dît, gava ku Berxikê ji
heft mohran yekî vekir[3] û min
bihîst ku yekî ji çar afirên zindî,
bi dengekî mîna gurmîniya ezmên
got: Were! 2 Û dîtim û a vay, hes-
pekî sipî û kevanekî yê li ser wê
siwar e hebû û tacekî bona wî hate
dayîn û bona ku serfiraz bê, bi ser-
keftinê ve derket.
3 Û Dema mohra duwemîn vekir,
min gotina afirê zindî yê duwemîn
ku got: Were[4]! bihîst. 4 Û hespekî
din, hespek sor derket û bona aşitî
ji dinê ve rake û bona hev û din
serjêkirinê rayedarî ji yê ku li ser
wê siwar e re hate dayîn û şûrekî
mezin ji wî re hate dayîn.
5 Û dema mohra sêwemîn vekir,
min gotina afirê zindî yê sêwemîn
ku got: Were[5]! bihîst. Û dîtim û
a vay, hespekî reş û şehînek[6] di
destê yê ku li ser wê siwar bû de

---

1 Aletekî mûzîkê.
2 An jî: Û te, me di xizmeta Xwadayê me de kirin qiraliyet û kahînan û dê em ê li ser dinê serweriyê bajon.
3 An jî: Û min dît, çawa Berxik ji heft mohran yekî vedike.
4 An jî: Were û bibîne!
5 An jî: Were û bibîne.
6 An jî: Teraziyek.

hebû. 6 Û di nava çar afirên zindî
de wekî dengekî ûsa axifî bihîs-
tim: Olçekek genim bi dînarekî[1] û
sê olçek ceh bi dînarekî û xesarê[2]
nede zeyt û xemrê!
7 Û dema mohra çaremîn vekir,
min gotina afirê zindî yê çaremîn
ku got: Were[3]! bihîst. 8 Û dîtim
û a vay, hespekî bengzavêtî[4] û
navê yê ku li ser wê siwar bûbû
Mirin bû û warê miriyan li pey wî
dihat. Û rayedariya mirina bi şûr
û xela û weba û bi heywanên hov
yên rûyê erdê, bona ji çaran li ser
pariyekî rûyê erdê belav bikin ji
wan re hate dayîn.
9 Û dema mohra pêncemîn vekir,
min li binya pêşkêşgehê canê yên
bona gotina Xwedê û şahdeyiya
ku domandine hatine kuştin dît.
10 Û bi dengekî bilind qêriyan û
gotin: Ya Efendiyê[5] pîroz û rast!
Bona ku tu yên li rûyê erdê daraz
bikî û heyfa xwîna me bistînî, hîn
tuyê çiqas bisekinî?
11 Û ji her yekî ji wan re, qeftanê
sipî hate dayîn û ji wan re hate go-
tin ku bila heta hejmara rêhevalên
wanî dîl û birayên wanî mîna wan
bên kuştin temam bibe, demekî
kurt rehet bikin.
12 Û dema mohra şeşemîn vekir,
min dît û a vay, erdhejînek[6] mezin
bû û roj, mîna pertalek[7] ji mûyê
be, reş bû û hemûya heyvê bû
mîna xwînê 13 û sitêrkên ezman,
gava ku darê hêjîrê bi bayek xurt
bête kilkirin çawa hêjîrên xwe
yî xag diweşîne, ketin ser rûyê
erdê. 14 Û ezman, mîna tomarek
bê pêçandin ji holê ve rabû û her
çiya û her girav ji cîhê xwe ve
hatin rakirin. 15 Û qiralên dinê
û mezinên wê û fermandarên wê
û dewlemendên wê û xurtên wê
û hemû azad û mirovên wê yî dîl
li şikeftan û di nava zinarên çiya-
yan de xwe veşartin 16 û ji çiya
û zinaran re digotin: Bi ser me
ve bikevin û ji rûyê yê li ser text
ve rûniştiye û ji xezeba Berxikê
ve me veşêrin! 17 Ji ber ku roja
mezin ya xezeba wan hat û ma kî
dikare bisekine[8]?

### *144.000 kesê ku hatine mohr kirin*

Hêz 9,3-6

7 Û paşî vêya, bona ku bi ser
erdê ve û bi ser behrê ve û bi
ser darê her wekî ve ba nebe, çar
milyaketên ku bi girtina çar bayê
erdê, li çar aliyê rûyê erdê ve di-
sekinin, dîtim. 2 Û milyaketekî
din, yê ku mohra Xwedayê zindî
pê re bû, ji rojhilatê ve derdikeve
dîtim û wî ji çar milyaketên ku

---

1 Li rasteka menan binêrin.
2 Ziyan, zerar.
3 An jî: Were û bibîne!
4 Mat.
5 Xudan, Hikumdar.
6 Zelzeleyek.
7 Mîna çûlekî, cilekî.
8 An jî: Ma kî dikare li hemberê vêna bisekine.

rayedariya xesariya erd û behrê ji
wan re hatiye dayîn re bi dengekî
bilind qêriya û got: 3 Heta ku em
qûlên Xwedayê xwe ji eniya wan
ve bi mohr bikin, xesarê nedin erd
û behr û daran!
4 Û min hejmara yên ku hatine
mohrkirin bihîst: Ji hemû eşîrên
Lawên Îsraêl, sed û çel û çar he-
zar hatibûn mohrkirin.
5 Ji eşîra Cihûda donzdeh hezar
hatibûn mohrkirin;
ji eşîra Rûben donzdeh hezar,
ji eşîra Gad donzdeh hezar,
6 ji eşîra Aşer donzdeh hezar,
ji eşîra Naftalî donzdeh hezar,
ji eşîra Manaşşe donzdeh hezar,
7 ji eşîra Şîmeûn donzdeh hezar,
ji eşîra Lêwî donzdeh hezar,
ji eşîra Îsşakar donzdeh hezar,
8 ji eşîra Zebûlûn donzdeh hezar,
ji eşîra Ûsiv donzdeh hezar,
ji eşîra Benyamîn donzdeh hezar
hatibûn mohrkirin.

*Ajaweya ku xwe bi qeftanên sipî ve pêçayî ne*

9 Paşî vêya dîtim û a vay, ajaweyek
mezin ya ku kes nikare bijmêre, ji
her netewî, ji her eşîrî, ji her gelî û ji
her zimanî ava bûye, li ber text û li
ber Berxikê ve sekinîbûn; qeftanên
sipî li xwe kiribûn û di destê wan de
guliyên xurmê hebûn. 10 Û bi den-
gekî bilind diqêriyan û digotin: Xe-
laskirin, mexsûsî Xwedayê me yî li
ser text ve rûniştî û Berxikê ye!
11 Û hemû milyaket li dora text
û kalepîran û çar afirên zindî ve
disekinîn û li ber text xwe bi ser
rû davêtin erdê, ji Xwedê re di-
peristin û digotin: 12 Amîn! Bila
pesnahî û bilindahî û zaniyarî û
şikirî û hurmet[1] û hêz û qudret, bi
abadîna abadînan ve ji Xwedayê
me re be! Amîn.
13 Û yekî ji kalepîran bersiv da
min û got: Vanê ku qeftanê sipî li
xwe kirine kî ne û ji ku ve hatine?
14 Û ji wî re gotim: Ya efendiyê
min, tu dizanî!
Û wî ji min re got: Vana, yên ji
wê tengasiya mezin ve têne ne û
wan qeftanên xwe şuştin û wan
qeftanên xwe di xwîna Berxikê
de sipî kirin. 15 Bona vêya li ber
texta Xwedê ne û roj û şev di Pe-
restgeha wî de, ji wî re xizmetê di-
kin û yê li ser text ve rûniştiye, dê
çadira xwe li ser wan ve vegire.
16 Û ew dê êdî birçî nebin û êdî
tî nebin û ne roj, ne jî germayi-
yek li wan nexîne; 17 ji ber ku dê
Berxikê ku li nava text e wan bajo
û bibe çavkaniyên avên jiyanê û
dê Xwedê hemû hêstiran ji çavên
wan ve paqij bike.

*Vekirina mohra heftemîn û buxurdana zêrînî*

8 Û dema mohra heftemîn vekir,
li ezman, qasî nîv saetî bêdengî

1 Birêzî.

çêbû. 2 Û min heft milyaketên ku
li ber Xwedê disekinin dît û ji wan
re heft borîjen hate dayîn.
3 Û milyaketekî din hat û bu-
xurdanekî zêrînî di dest de, li
ber pêşkêşgehê ve sekinî û bona
ku li pêşkêşgeha li ber text,
tevî duayên pîrozan ve pêşkêş
bike, gellek buxur ji wî re hate
dayîn. 4 Û duayên pîrozan û
dûyê buxurê, li ber Xwedê ji
destê milyaket ve bilind bû.
5 Û milyaket buxurdanê rahişt û
bi agirê pêşkêşîgehê ve dagirt û
avêt rûyê erdê û deng û gurmî-
niyên ezman û birûsk û erdhejîn
bûn.

*Heft borîjen*

6 Û heft milyaketên ku heft borîjen
bi wan re bûn, bona borîjenê lêxin,
amade bûn.
7 Û milyaketê yekemîn li borîjenê
xist û zîpikên[1] bi xwînê ve tevli-
hev û agir ava bû û bi rûyê erdê
ve hatin avêtin. Û ji siseya yekê
erdê şewitî û ji siseya yekê dar-
an şewitîn û hemû gîhayên hêşîn
şewitîn.
8 Û milyaketê duwemîn li borîjenê
xist û wekî ku çiyayekî mezin ê
ku bi agir ve tête şewitandin bi
hundirê behrê ve hate avêtin û
ji sisiya yekê behrê bû xwîn 9 û
ji siseyan yekê afirên zindî, yên
di behrê de ne mirin û ji siseyan
yekê keştiyan tune bûn.
10 Û milyaketê sêwemîn li
borîjenê xist û ji ezman, sitêrkek
mezin mîna pêtalê[2] vêdikeve ket
ser ji siseyan yekê çeman û ket ser
çavkaniyên avê 11 û navê vê stêr-
ka Pelîn e. Û ji siseyan yekê avan
mîna pelînê bûn û gellek mirov ji
avan mirin; ji ber ku av tahl bûn.
12 Û milyaketê çaremîn li
borîjenê xist û ji siseyan yekê
rojê û ji siseyan yekê heyvê û ji
siseyan yekê sitêrkan hatin lêxis-
tin; da ku, ji siseyan yekê wan
vemirîn û ji siseyan yekê rojê û
şevê jî bê ronahî man.
13 Û min dît û min bihîst ku qerte-
lek di nava ezman de difire û bi
dengê bilind digot: Ji ber dengê
borîjenên sê milyaketên dinî li
borîjenan bixin wey, wey, wey
li serê yên ku li ser rûyê erdê rû-
dinin!

*Borîjena pêncemîn*

9 Û milyaketê pêncemîn li
borîjenê xist û min sitêrkek ji
ezman ve ketiye erdê dît û qufleya
bîra ku dadikeve kûritiyên bêbinî
ji wî re hate dayîn. 2 Û wî bîra
kûritiyên bêbinî vekir, ji bîrê ve
dûhekî mîna dûhê ocaxekî mezin
derket û ji dûhê bîrê, roj û hewa
tarî bûn. 3 Û ji nava dûhê ve, kulî

1 Xilorîkên.

2 Meşale.

derketin rûyê erdê; hêzekî mîna
dûpişkên rûyê erdê ji vana re hate
dayîn. 4 Û ji wan re hate gotin
ku, bila ne gîhayê erdê, ne tiştekî
hêşîn û ne jî darekî, lê xesarê
bidin mirovên di eniya wan de
mohra Xwedê nîne. 5 Û destûra
ne bona ku wan bikujin, lê pênc
meh tahdê li wan bikin, ji wan re
hate dayîn. Û lêdana wan, mîna
êşa, dema dûpişkek bi mirov ve
vede dide bû. 6 Û di wan rojan de
dê mirov li mirinê ve bigerin û dê
wê nebînin û ew ê bêriya mirinê
bikin û dê mirin ji wan ve bireve.
7 Û şiklên kuliyan, mîna hespên
ji cengê re hatine amade kirin
bûn û li ser serê wan tacên wekî
zêrînî bin hebûn û wecê wan
mîna wecê mirovan bû. 8 Û mîna
porên pîreka porên wan hebûn û
diranên wan mîna diranê şêran
bûn. 9 Û zirxên wan, zirxên mîna
ji hesin ve hebûn û dengê bazikên
wan mîna dengê gellek erebeyên
hespan, yên ku dibezin şer bû.
10 Û terî û derziyên wanî mîna yê
dûpişka ne hebû û bi teriyên xwe
xwediyê hêza ku dikarin pênc
mehî xesarê bidin mirovan bûn.
11 Û li serê wan, bi qiralbûnê
milyaketê kûritiyên bêbinî hebû;
navê wî bi Îbranîtî Abadon û bi
Grekî Apolyon[1] e.
12 Wey a yekemîn derbas bû, a vay,
li pey vêya hîn du weyên din tên!
13 Û milyaketê şeşemîn li borîjenê
xist û min ji çar qiloçên pêşkêşgeha
zêrînî, ya ku li ber Xwedê ye den-
gekî bihîst; 14 ji milyaketê şeşemîn
ya borîjen di destê wî de ye re got:
Çar milyaketên li cem çemê Fe-
rata mezin ve girêdayîne veke!
15 Û çar milyaketên bitûmî bona
wê saetê û wê rojê û wê mehê û wê
salê amade têne sekinandin, bona
ku ji siseyan yekê mirovan biku-
jin, hatin vekirin. 16 Û hejmara
artêşên siwaran[2], du carî deh hezar
carî deh hezar bûn[3], min hejmara
wan bihîst. 17 Û bi vî awayî di
xewn û xeyalê de[4], hespan û yên
ku li wan siwar bûne, zirxên wanî
mîna ji agir, yaqûtê mor û kewkur-
dê ve hebûn, dîtim; serê hespan
mîna serê şêran bû û ji devê wan
agir û dûh û kewkurd derdiket.
18 Ji sisiyê yekê mirovan, ji ber
agir û dûh û kewkurda ku ji devê
vana derdikeve, ji van sê asîwan
ve hatin kuştin. 19 Ji ber ku hêza
hespan di dev û teriyê wan de ye
û serê teriyên wanî mîna mara ye
hene û bi vana ve xesarê didin.
20 Û mayiyên mirovên ku bi van
asîwan ve nehatine kuştin bona
ku ji cinan re û ji pûtên darinî, zêr
û zîv û tûnc û kevir in û nabînin,

---

1 Ev her du yek, di maneya helaq kir, an jî; meh-fker de ne.
2 Hespiyan.
3 Du sed milyon bû.
4 Di dîtinê de.

nabihîzin û nameşin re secde ne-
kin, ji karên destên xwe ve tobe
nekirin. 21 Û ji qesasiyên[1] xwe û
sêrbaziyên xwe û ji zîna û dizî ki-
rinên xwe tobe nekirin.

*Milyaket û kitêba biçûk*

10 Û min milyaketekî din, yê
bihêz ji ezman ve dadike-
ve dît; xwe bi ewran ve pêça bû
û keskesorek li ser serê wî hebû
û wecê wî mîna rojê û lingên wî
mîna sitûnên agir bûn. 2 Û di des-
tê wî de kitêbek biçûk, ya ku ha-
tiye vekirin hebû û wî lingê xwe
yî rastê avêt ser behrê û yê çepê jî
avêt ser erdê 3 û mîna gurmîniya
şêran bi dengekî bilind bang kir û
dema wî bang kir, heft gurmîniyên
ezman bi dengê xwe bang kirin. 4
Û dema heft gurmîniyên ezman
bang kirin, xwestim ku binivîsim
û ji ezman ve dengekî: Gotinên
heft gurmîniyên ezman nenivîsî-
ne, wan bi mohr bike! dibêje bi-
hîstim. 5 Û milyaketê ku min li ser
behr û li ser erdê ve wî dît, destê
xwe yî rastê ber bi ezman ve rakir
6 û bona heqê yê ku ezman û yên
li ezman in û erd û yên li erdê ne
û behr û yên di behrê de ne afiran-
diye û yê bi abadîna abadînan ve
dijî sond xwar û got: Êdî dê muh-
let nebe[2]. 7 Lê belê di rojên dengê
milyaketê heftan de, dema dê li
borîjenê bixine, wekî ku ji qûlên
xwe yî peyxamber ve mizgînî
daye, dê raza[3] Xwedê jî biçe serî[4].
8 Û dengê ku min ji ezman ve
bihîstibû, dîsa bi min re dest bi
axaftinê kir û got: Here, kitêba
biçûk ya vekirî, ya di destê milya-
ketê li ser behr û erdê de sekiniye
bistîne!
9 Û ez çûm cem milyaket û jê re
gotim ku: Bila kitêba biçûk bide
min! Û ji min re got: Bigire û
vêya bixwe û dê di zikê te de tah-
liyek çê bike, lê belê di devê te de
dê mîna hungiv şêrîn bibe. 10 Û
min kitêba biçûk ji destê milyaket
girt û xwar û di devê min de mîna
hungiv şêrîn bû. Lê belê dema
min wê xwar, mahdê min tahl bû.
11 Û wî ji min re got: Hewce ye
ku, tu dîsa di derheqê gellek ne-
teweyan û gelan û zimanan û qi-
ralan de peyxambertiyê bikî!

*Du şahde*

11 Û qamîşekî pîvanê ya mîna
şivekê ye, ji min re hate
dayîn û hate gotin: Rabe û Perest-
geha Xwedê û pêşkêşgehê û yên
li wir peristinê dikin bipîve! 2 Lê
belê hewşa Perestgehê ya derve
berde û wir nepîve; ji ber ku wir, ji
neteweyên ku bajarê pîroz dê çel

1 Mêrkujî.
2 Derengî nebe, demdiyar nebe.
3 Sir.
4 Temam bibe.

û du meh bi lingên xwe ve bicûn[1]
re hate dayîn. 3 Û ez ê hêzê bidim
du şahdeyên xwe û wekî cilikan li
xwe kirî, dê hezar û du sed û şêst
rojî peyxambertiyê bikin.
4 Vana du darên zeytûnê û du
şimadankên li ber Xudanê dinê
ve sekiniye ne. 5 Û ger kesek
bixwaze ku xesarê bide wan, ji
devê wan agir dipejiqe û neyarên
wan dixwe û diqedîne û ger kesek
bixwaze ku xesarê bide wan,
divê ew bi vî awayî bête kuştin.
6 Rayedariya wan heye ku heta
dema peyxambertiyê bikin, bona
ku baran nebare dikarin ezmanê
bigirin û xwediyê rayedariya avê
vegerandina xwînê û çend cara
bixwazin dikarin bi her cûreyê
asîwê ve li rûyê erdê bixin. 7 Û
ger wexta wanî şahdeyiyê biqe-
de, dê cenawirê ji kûritiyê bê-
binî ve derkeve bi wan re cengê
bike û wan bindest bike û bikuje.
8 Û cesedên wan, bi nîşanî dê li
rêya mezin ya bajarê mezin ku bi
ruhanî, bi navê Sodom û Misirê
ve tê binav kirin, bê raxistin; Xu-
danê wan jî li wê derê hatibû xaç-
kirin. 9 Û mirovên ji her netewî
û eşîretî û zimanî û gelan dê sê
roj û nîv li cesedên wan binihêrin
û destûrê nadin ku cesedên wan
têxin goristanê. 10 Û yên li ser
rûyê erdê rûdinin, dê li ser wan
kêfxweş bibin û cejnê bikin, xe-
latan ji hev û din re bişînin; ji
ber ku van her du peyxamberan,
eziyetê li yên ku li ser rûyê erdê
rûdinin kiribûn.
11 Û piştî sê roj û nîvê ji Xwedê
ve ruhê jiyanê kete hundirê wan
û rabûn ser pêlên xwe û tirsekî
mezin ket ser yên ku wan dîtin.
12 Û ji ezmanan ve ji wan re den-
gekî bilind yê ku dibêje: Derke-
vin ser vir! bihîstin. Û di ewr de
hilkişiyan ezman û neyarên wan,
wan dîtin. 13 Û tam di wê saetê
de, erdhejînek mezin bû û ji dehan
yekê bajarê xera bû û di erdhejînê
de heft hezar kes can dan û yên li
paşê man, bi tirsek mezin ve ketin
û Xwedayê ezmanan bilind kirin.
14 Wey a duwemîn derbas bû; a
vay, wey a sêwemîn bi lez[2] tê!

*Borîjena heftemîn*

Zeb 2; Zeb 97; Dan 7,9-14

15 Û milyaketê heftemîn li
borîjenê xist û bi gotina: Ser-
weriya dinê bû ya Xudanê me û
Mesîhê wî û dê ew ê bi abadîna
abadînan ve serweriyê bajo! li ez-
man dengên bilind çêbûn.
16 Û bîst û çar kalepîrên li ber
Xwedê, li ser textên xwe rûniştibûn
bi ser rû ve xwe avêtin erdê û ji
Xwedê re peristin û gotin: 17 Ya
Xudan, Xwedayê ku şiyandarê

---

1 Bieciqînin, an jî: Bipelixînin.

2 An jî: Zû.

her tiştî ye, yê ku heye û yê ku
hebû; em ji te re şikir dikin; ji ber
ku te qudreta xwe yî mezin hilgirt
û dest bi ajotina serweriyê ve kir!
18 Û neteweyan bi xezebê ve ketin
û xezeba te hat û dema daraz kiri-
na miriyan û dema bi xelat kirina
peyxamber û pîrozên, dixwaze bila
mezin û dixwaze jî bila biçûk be,
yên ji navên te ve ditirsin û qûlên
te ne û dema wêran kirina yên ku
rûyê erdê wêran dikin hat!
19 Û Perestgeha Xwedê ya li ez-
mana ye vebû û di Perestgeha wî
de Sindoqa Peymana wî xuyanî
bû û birûskan û dengan û gurmî-
niya ezmanan û erdhejîn û zîpikên
mezin çêbûn[1].

*Pîrek û Ejderha*

12 Û li ezman ve nîşanek me-
zin[2] xuya bû: Pîrekek bi
rojê ve pêçayiye û di binya lingên
wê de heyv û li serê wê tacek ji
donzdeh stêrkî ye hebû. 2 Û ew
bi ducanî[3] bû û di nava janên
zayinê de vedigevizî û diqêriya.
3 Û li ezman, nîşanek din xuya
bû: Û a vay, bi heft serî û bi deh
qiloçî û di ser seriyên wî de heft
tac hebûn, ejderhayek mezin û
sor hebû. 4 Û teriya[4] wî ji siseyan
yekê sitêrkên ezmanan kaş dikir û
wan avêt rûyê erdê. Û ejderha li
ber pîreka ku li ber welidandinê
ye, bona ku dema biwelidîne[5] za-
rokê wê daqurtîne disekinî. 5 Û
wê lawekî, zarokekî mêr, yê ku
dê hemû netewan bi darekî hesinî
ve bajo anî dinê[6] û zarokê wê hate
girtin û birin cem Xwedê û cem
texta wî. 6 Û pîrek reviya çolê, li
wir, bona ku hezar û du sed û şêst
rojî li wê derê bête xwedî kirin,
cîhekî wê, yê ji aliyê Xwedê ve
hatiye amade kirin heye.
7 Û li ezman şer çêbû: Mikaîl û
milyaketên xwe, li dijî ejderha
ve şer kirin. Û ejderha, bi milya-
ketên xwe ve li dijberî wan şer
kirin, 8 lê belê ew serfiraz nebûn
û cîhên wanî li ezman êdî nehat
dîtin[7]. 9 Û ejderhayê mezin, ew
marê kevn ku hemûya dinê ji rê
ve derdixist, yê bi navê Îblîs an
jî Şeytan ve tê binav kirin û bi
milyaketê xwe ve bi rûyê erdê ve
hatin avêtin. 10 Û min bihîst ku li
ezman, dengekî bilind ûsa dibêje:
Xelaskirina Xwedayê me û hêza
wî û serweriya wî û rayedariya
Mesîh niha hate cîh[8]! Ji ber ku
tawanbarkirê[9] birayên me, yê ku
wan li ber Xwedayê me bi roj û

1 An jî: Teqiya.
2 Derasayî, ne taybetî.
3 Bi heml.
4 An jî: Doçik, poçik, boçik.
5 An jî: Dema zarok bînîna dinê.
6 Za,welidand.
7 Cîhên xwe yî ezmanan êdî winda kirin.
8 Rast bû, hate pêkanîn.
9 Sûcker.

şev ve bi tawan xuya dikir, bi jêr
ve hate avêtin.
11 Û wan ji ber sedema xwîna
Berxikê û ji ber sedema gotina
şahdeyiya xwe ve wî mexlûb ki-
rin û heta mirinê ji canê xwe hez
nekirin! 12 Bona vêya, ya ez-
manno û yên di wan de rûdinin,
kêfxweş bibin! Wey li erdê û
behrê! Ji ber ku Îblîs bi zanebû-
na dema xwe yî kêm e, bi hêrsekî
mezin ve daket ser we.
13 Û dema ejderha dît ku bi rûyê
erdê ve hatiye avêtin, dest bi bera
dana pîreka ku zarokê nêr ani-
ye dinê kir. 14 Û bona ku ji ber
mar ber ve çolê, ber ve cîhê xwe
ve bifire, her du bazikên qertelê
mezin, ji pîrekê re hate dayîn; di
demekî û deman û nîv demê de
li wê derê tête xwedî kirin. 15 Û
mar, bona pîrekê bi ber ava le-
hiyê ve bibe, ji devê xwe, li pey
wê mîna çemekî av rijand. 16 Û
erd, ji pîrekê re alîkarî kir û erd
devê xwe vekir û çemê ku mar ji
devê xwe ve rijandiye daqurtand.
17 Û ejderha li dijî pîrekê hêrs
bû[1] û bona ku bi kesên ji nîjada
wê, paş ve maye û emirên Xwedê
tînin cîh û di wan de şahdeyiya
Îsa heye re şer bike çû. 18 Û ez li
ser qûma behrê sekinîm.

*Cenawirê ku ji Behrê ve derdikeve*

Dan 7; Pey 17,7-17

13 Û min cenawirekî ji behrê
ve derdikeve dît, deh qiloç
û heft seriyê wî û li ser qiloçên
wî deh heb tac hebûn û li ser serê
vana, navên di şuna kufrê de ne
hebûn. 2 Û cenawirê ku min dît,
mîna parsekî[2] bû û lingên wî mîna
lingên hirçan û devê wî mîna devê
şêran bû û ejderha, tevî hêz û tex-
ta xwe, rayedariyek mezin da wî.
3 Û ji seriyên wî yekî mîna birî-
nek mirinî stendîbe dîtim û birî-
na mirinê hate başkirin û hemûya
dinê, li pey cenawir ve şaş û metal
ma[3]. 4 Û wan bi ejderhayê raye-
dariyê daye cenawirê ve peristinê
kirin û bi gotina: Ma qey ya mîna
cenawir heye? Kî dikare bi wî re
şer bike? ji cenawirê re peristîn.
5 Û devekî gotinên bi quretî û ku-
firan bike û rayedariyek bi çel û
du mehî bişuxulîne ji wî re hate
dayîn. 6 Û bona li dijî Xwedê ku-
fir bike, bona kufiran ji navê wî û
mala wî re, yanê, ji yên li ezman
ve dijîn re bike, devê xwe vekir.
7 Û ji wî re destûr hate dayîn ku,
bikaribe li dijî pîrozan şer bike û
wan bindest bike û ji wî re li ser
her eşîr û her gel û her ziman û her
neteweyan ve rayedarî hate dayîn.
8 Û hemûyên li rûyê erdê ve dijîn

1 Li dijî pîrekê hate xezebê.
2 Heywanekî mîna pilingan.
3 Ecêbmayî man.

û ji ava kirina dinê ve navê wan di kitêba jiyanê ya Berxê ku hatiye serjêkirin de nehatiye nivîsîn, dê ji wî re biperistin. 9 Ger guhên kî hebe, bila bibihîzin!

10 Ger mirovek bona bindestiyê be[1], ew dê here bindestiyê.
Ger yekî bi şûr ve bikuje be, divê ew bi şûr ve bête kuştin.
Sebir û baweriya pîrozan di vê de ye!

*Cenavirê ku ji erdê ve derdikeve*

Pey 14,9-11; 19,20; 2.Sel 2,9-12

11 Û min cenawirekî dinî ji erdê ve derdikeve dît û mîna berxikekî du qiloçê wî hebûn û mîna ejderha diaxifî[2]. 12 Û hemû rayedariya cenawirê yekemîn, li ber çavê wî dişuxulîne. Û bi rûyê erdê û heçî kesên li ser wê ve dijîn, ji cenawirê yekemîn, yê birîna wî yî mirinî baş bûye re dide secde kirin. 13 Û li ber mirovan, mûcîzetên qasî ji ezman ve agir bibarîne rûyê erdê çê dike. 14 Û ji yên ku li ser rûyê erdê rûdinin re, bona ji cenawirê ku pê re birîna şûr heye û jiya ye[3] sûretekî çêbikin dibêje û ji ber sedema elametên ku bona li ber cenawir bête çêkirin jê re hatine dayîn, yên ku li rûyê erdê ve rûdinin ji rê ve çewt dike. 15 Û bona ku hilma jiyanê bide senema cenawir, wî biaxifîne û bona hemûyên ku ji wî re peristinê nekin bide kuştin, qudret ji wî re hate dayîn. 16 Û mohrek li ser destê rastê an jî eniya her kesê biçûk û mezin û dewlemend û xizan û azad û dîl ve dide xistin 17 û xeynî kesên ku navê cenawir, an jî mohra hejmara navê wî nîşan dide bi wan re ye, tu kes nikare bikire, an jî bifiroşe[4].

18 Hîkmet li vir e[5]. Yên dikarin fêhm bikin, bila hejmara aidî cenawir e bihesibînin; ji ber ku hejmara mirovekî ye[6] û hejmara wî şeş sed û şêst û şeş e.

*Berxik û 144.000 kes*

14 Û dîtim û a vay, Berxik li ser Çiyayê Siyonê sekiniye û tevî wî sed û çel û çar hezar kesê li ser eniya wan navê wî û navê Bavê wî hatiye nivîsandin hebûn. 2 Û ji ezman dengekî mîna dengê gellek avan û mîna dengê gurminiya ezmanan ya mezin bihîstim û dengê ku bihîstim, mîna dengê çenkvanên ku li çenkên xwe dixînin bû. 3 Û wan li ber text, li ber çar afirên zindî û kalepîran ve wekî qesideyekî nû bistirên û xeynî sed û çel û çar hezar kesên ku ji rûyê erdê ve hatine stendin, tu

1 Ger mirovek kesên din bindest bike...
2 Digot, dipeyîvî.
3 Nemiriye.
4 Nahêle danûstendinê bike, an jî: Û ger di kesekî de navê cenawir, an jî mohra hejmara navê wî nîşan dide tune be, nikare danûstendinê bike.
5 Ev babeta hewceyî zaniyariyê dike.
6 An jî: Mirovekî nîşan dike.

kes hînî wê qesîdê nabe. 4 Yên ku
xwe bi pîrekan ve bi leke nekiri-
ne vana ne; ji ber ku pak in. Vana,
Berxik biçe ku, yên li pey wî diçin
in. Bona ku ji Xwedê û Berxikê re
bibin nûber, vana ji nav mirovan
ve hatine stendin. 5 Û di devê wan
de derew nehat dîtin; ji ber ku ew
li ber texta Xwedê bêqisûr in.

*Sê Milyaket*

6 Û min milyaketekî din, yê ku
bona her gelî û nîjadî û zimanî û
netewî mizgînî bike, di wî de Miz-
gîniya abadîn heye û di navenda
ezmên de difire dît. 7 Bi denge-
kî bilind digot: Ji Xwedê bitirsin
û mezinahiyê bidin wî; ji ber ku
saeta wî yî daraz kirinê hat û bi yê
ezman û erd û behrê û çavkaniyên
avê afirandiye ve biperisin!
8 Û milyaketekî din, yê duwemîn,
ji pey wî hat û got: Xera bû, Babî-
la mezin ya ku ji xemra zînaya
xwe yî har bi hemû gelan ve da
vexwarinê xera bû!
9 Û milyaketekî din, yê sêwemîn,
yê ji pey wan hat, bi dengekî
bilind got: Ger kesek bi cenawir
û bi senemekî di mînaka wî de yî
bipereste û li ser eniya xwe, an jî li
ser destê xwe mohra wî qebûl bike,
10 dê ew jî ji xemra hêrsa Xwedê
ya di kaseya xezeba wî de bi safî
hatiye amade kirin vexwe û dê ji
wî re, li berya Berxik û milyaketên
pîroz ve bi agir û kewkurdê ve
lêdan bêkirin. 11 Û duhê lêdana ku
dikişînin, heta abadîna abadînan
didome û aramiya yên bi cenawir
û bi senemê wî ve diperistin û
mohra navê wî qebûl dikin, bi roj
û şev nîne. 12 Sebra pîrozên ku bi
emirên Xwedê û baweriya Îsa ve
digirin di vê de ye.
13 Û min dengek ji ezman ve
bihîst û ji min re got: Binivîsîne:
Ji niha pê ve, xwezî li kesên bi
aidbûna Xudan ve bimirin! Ruh
dibêje: Belê, dê ji şuxlên xwe ve
rawestin; ji ber ku karên wan bi
wan re diçe.

*Dexla erdê tê çinandin*

Met 13,37-43; Îşa 63,1-6; Yow 4,12-17

14 Û min dît û a vay, ewrekî sipî
û yekî mîna lawê mirov li ser
ewran rûniştî, di serê wî de tacekî
zêrînî û di destê wî de oraqekî tûj
hebû. 15 Û milyaketekî dinî ji
Perestgehê ve derket, ji yê li ser
ewran ve rûniştiye re, bi dengekî
bilind bang kir û got: Oraqa xwe
dirêj bike û biçîne; ji ber ku saeta
çinandinê hat; ji ber ku dexla erdê
gîhaştiye[1]! 16 Û yê li ser ewran
rûniştiye, oraqa xwe li ser erdê ve
kil kir û dexla erdê hate çinandin.
17 Û ji Perestgeha li ezman, mil-
yaketekî din derket; oraqek wî yî
tûj jî hebû. 18 Û milyaketek dinî li
ser agir ve rayedar e ji pêşkêşgehê

1 An jî: Residiye, cemisiye.

derket û ji yê oraqa wî yî tûj heye
re, bi dengekî bilind bang kir û
got: Oraqa xwe yî tûj bişîne û tiri-
yên mêwê erdê bicivîne; ji ber ku
tiriyên wê gîhaştin! 19 Û milya-
ket oraqa xwe avêt ser erdê[1] û ti-
riyên mêwa erdê berhev kir û avêt
mahsera[2] mezin ya hêrsa Xwedê.
20 Û li derveyî bajêr di mahserê
de hate pêlê kirin[3] û ji mahserê,
di dûrahiya hezar û şeş sed tîr
avêtinê[4] de, xwîn heta lixabê[5] hes-
pan bilind bû.

*Heft Milyaket û heft belayên dawîn*

15 Û min li ezman, nîşanekî dinî
mezin û mirovan şaş dike dît:
Heft milyaketên ku bi wan re heft
belayên dawîn hene; ji ber ku hêrsa
Xwedê bi wan ve diçe serî[6].
2 Û bi agir ve tevlihev behrekî
wekî ji camê be û yên ku cenawir û
sûretê wî û hejmarê navê wî mex-
lûb kirine, wekî çenkên Xwedê di
destên wan de be, li ser behra ku ji
camê ye sekinîne dîtim. 3 Û qesîda
qûlê Xwedê Mûsa û qesîda Berxikê
distirên û dibêjin: Ya Xudan, Xwe-
dayê ku şiyandarê her tiştî ye!
Karên te mezin û yên bi wan ve
şaş dibin e.
Ya qiralê pîrozan[7], rêyên te rast û
bi dad in!
4 Ya Xudan, ma kî ji te natirse û
navê te bilind nake? Ji ber ku tenê
tu pîroz î[8].
Belê, dê hemû netewe werin û li
ber te biperistin.
Ji ber ku karên te yî bi dad, bi
eşkeretî hatin dîtin!
5 Û paşî vêya, min dît û a vay,
Perestgeha li ezman, Çadira
Şahdeyiyê vebû. 6 Û heft milya-
ketê ku heft bela bi wan re hene,
bi ketenê pak û dibiriqe û li sînga
xwe şûtikên zêrînî girêdayî bûna
xwe ve ji Perestgehê ve derke-
tin. 7 Û yekî ji çar afirên zindî,
heft tasên zêrînî yên bi hêrsa
Xwedayê bi abadîna abadînan
ve dijî ve tijî, da heft milyaketan.
8 Û Perestgeh bi duhê bilindahî
û qudreta Xwedê ve tijî bû û heta
ku heft belayên heft milyaketan
qediya, kes nikarîbû biketa Pe-
restgehê.

*Hêrsa Xwedê û heft tas*

2.Mûs 7-10

16 Û min dengekî bilind ji
Perestgehê bihîst ku, ji heft
milyaketan re got: Herin û heft
tasên bi hêrsa Xwedê ve tijî li ser
rûyê erdê ve valakin!
2 Û yê yekemîn çû û tasa xwe
li ser rûyê erdê vala kir û li ser

1 Dirêjî erdê kir.
2 Cendera.
3 Hate şidandin.
4 Li rasteka menan binêrin.
5 An jî: Gem, liwan.
6 An jî: Dê bi van asîwan ve temam bibe.
7 An jî: Ya qiralê neteweyan!
8 An jî: Ji ber ku yê pîroz e tenê tu yî.

kesên ku mohra cenawir li wan e
û bi pûtê di mînakiya wî de ye di-
peristin, birînên erjeng û êşê dide
çêbûn.
3 Û yê duwemîn tasa xwe valayî
behrê kir û ew bû mîna xwîna
miriyan û hemû zindiyên di nav
behrê de ne mirin.
4 Û yê sêwemîn tasa xwe valayî
çem û çavkaniyên avê kir û vana
vegeriyan xwînê. 5 Û min bihîst
milyaketê ku ji avan ve rayedar e
got: Ya Xudanê Pîroz, yê ku heye
û yê ku hebû, tu bi dad î; ji ber ku
te wusa daraz kir!
6 Ji ber ku wan xwîna pîrozan û
peyxamberan rijandin û te bona
vexwarinê xwînê da wan; ji ber
ku vêya li xwe heq kirin!
7 Û min bihîst ku yekî din ji
pêşkêşgehê ve dibêje: Belê, ya
Xudan, Xwedayê ku şiyandarê
her tiştî ye, daraziyên te rast û bi
dad in!
8 Û yê çaremîn, tasa xwe valayî
ser rojê kir û hêza bi agir ve qemi-
randina mirovan jê re hate dayîn.
9 Û mirovan, bi germiyekî mezin
qeliyan û wan ji navê Xwedayê
ku serwerê van asîwan e re kufir
kirin û tobe nekirin ku bilindahiyê
bidin wî.
10 Û yê pêncemîn, tasa xwe bi
ser texta cenawir ve vala kir û ser-
weriya wî tarî bû û wan ji êşê, zi-
manê xwe gez kirin. 11 Û ji ber êş
û birînên xwe ji Xwedayê ezman
re kufir kirin û ji karên xwe tobe
nekirin.
12 Û yê şeşemîn, tasa xwe li ser
çemê Ferata mezin ve vala kir û
bona ku rêya qiralên ji rojhilatê
ve tên amade bibe, avên wê ziwa
bûn. 13 Û min sê ruhê mindar,
yên mîna beqan ji devê ejderha û
ji devê cenawir û ji devê peyxam-
berê sexte ve derketin dît. 14 Ji
ber ku vana ruhên cinên mûcîze-
tan dikin in; bona cenga dê di roja
mezin ya Xwedayê ku şiyandarê
her tiştî ye de bibe, diçûn civandi-
na hemû qiralên dinyayê.
15 – A vay, ez mîna dizekî têm!
Xwezî li kesê ku bona tazî nemî-
ne û di şermezariyê de nemîne,
hişyar dimînin û kincên xwe li ser
xwe dihêlin! –
16 Û wî ew li cîhê ku navê wê
di zimanê Îbranî de Armagedon
e, civand. 17 Û yê heftemîn tasa
xwe valayî ser hewayê kir û ji
Perestgehê, ji textê[1]; bi gotina:
Bû! dengekî bilind derket. 18 Û
birûsk û deng û gurmîniyên ez-
man bûn û erdhejînek mezin çê
bû; wusa ku, ji dema ku mirov li
rûyê erdê ne ve, mîna wê, erdhe-
jînek ewqas mezin çênebû. 19 Û
bajarê mezin bû sê parî û bajarên
netewan têkçûn û bona ku, kaseya
bi xemra bi hêrsa xezeba wî ve tijî
jê re bête dayîn, Babîla mezin li

[1] An jî: Ji texta Perestgehê, ya li ezman e.

ber Xwedê ve hate bîr anîn. 20 Û
her girave reviyan û çiya nehatin
dîtin[1]. 21 Û ji ezman, li ser mi-
rovan ve zîpikek mezin ya wekî
di giraniya talantekî[2] de be, bari-
ya û mirovan ji ber asîwa zîpikê
ji Xwedê re kufir kirin, ji ber ku
asîwa wê zehf mezin bû.

*Fahîşeya mezin Babîl tê ceza kirin*
Pey 16,19; Pey 13 û 18; Îşa 13-14; Îşa 47; Yêr 50-51

17 Û yekî ji heft milyaketên ku
heft tasên wan hene, hat û bi
min re axifî û got: Were! Ez ê ce-
zayê ji fahîşeya li qeraxa avên me-
zin ve rûniştiye nîşanî te bidim. 2
Qiralên erdê[3], bi wê re zinê kirin û
yên li ser rûyê erdê dijîn, bi xem-
ra zînaya wê ve serxweş bûn.
3 Û wî min di Ruh de bir çolistanê
û min li ser cenawirekî sor, yê ku
heft serî û deh qiloçên wî hene û
bi navên kufrê ve tijî ye, jinikekê
siwarbûyî dît. 4 Û pîrek, kincên
erxewanî û sor li xwe kiribû û
xwe bi zêr û kevirên bi qîmet û bi
înciyan ve xemilandibû û di destê
wê de kaseyek zêrînî ya bi tiştên
erjeng û bi mindariyên zînaya
xwe ve tijî hebû 5 û li ser eni-
ya wê, navek hatibû nivîsandin:
RAZ[4], BABÎL A MEZIN, DAYÎ-
KA FAHÎŞEYÊN Û ERJENGI-
YÊN DINÊ.
6 Û min dît ku, pîrek bi xwîna
pîrozan ve û bi xwîna şahidên
Îsa ve serxweş bûye û dema min
wê dît, ez ketim şaşiyek me-
zin. 7 Û milyaket ji min re got:
Çima tu şaş ma? Raza pîrekê û
ya cenawirê bi heft serî û deh qi-
loçî ez ê ji te re bibêjim. 8 Cena-
wirê ku tu dibînî, demekê hebû
û niha tune ye û demek din dê
ji kûritiyên bê binî ve derkeve û
bi têkçûnê[5] ve biçe. Û kesên li
ser rûyê erdê rûdinin û navê wan
cergî dinya ava bûye di kitêba ji-
yanê de nehatiye nivîsîn, dema
cenawir bibînin, dê şaş bibin; ji
ber ku ew demekê hebû û niha
nîne û dê dîsa bibe[6].
9 Bona fêhm kirina vêya hew-
ce ji zaniyariyê heye! Heft serî,
heft çiyayên ku pîrek li ser wan
ve rûniştiye û heft qiral in. 10 Û
pênc heb ketin û yek disekine,
yê din jî hîn nehatiye û dema bê,
lazim e ku demekî kurt bimîne.
11 Û cenawirê ku hebû, lê belê
niha nîne, bi xwe jî yê heyştemîn
e û dê ew ji heftan bibe yek û here
têkçûnê[7].
12 Û deh qiloçê ku tu dibînî, deh
qiralên ku hîn qiraletiyê nesten-

*1* Û çiya tune bûn.
*2* Di giraniya çel kîlo de.
*3* Dinê.
*4* Sir.
*5* An jî: Mirinê ve.
*6* Dê dîsa were.
*7* Mirinê.

dine nin[1]; lê belê vana, tevî cena-
wir mîna qiralan, dê bona saetekî
rayedariyê bistînin. 13 Ramanên
vana yek in, hêzên xwe û raye-
dariyên xwe didin cenawir. 14 Dê
vana bi Berxikê re şer bikin û dê
Berxik wan bindest bike; ji ber ku
ew Xudanê xudanan, Qiralê qi-
ralan e û yên bi wî re ne, yên ku
hatine bang kirin, hatine bijartin û
yên bi wî re dilsoz maye ne.
15 Û wî ji min re got[2]: Van avên
ku tu dibînî, cîhê ku fahîşe lê
rûniştiye, gelan û civakan û ne-
teweyan û zimanan in. 16 Û deh
qiloçên ku te li ser cenawir dît,
ew dê ji fahîşê ve bikerihin, wê
perîşan bikin û tazî bihêlin û ew
dê goştê wê bixwin û wê di agir
de bişewitînin. 17 Ji ber, heta ku
gotinên Xwedê biçe serî, Xwedê
kirina ramanê xwe û di yek ra-
manê de bûyînê û qiraletiya xwe
bi cenawir ve dayînê xist dilê
wan. 18 Û ev pîreka ku tu dibînî,
bajarê mezin yê li ser qiralên dinê
qiraletiya wê heye ye.

*Xerabûna Babîlê*

Pey 14,8; Îşa 21,9

18 Û piştî vêya dîtim ku, mil-
yaketek din yê ku xwediyê
rayedariyên mezin e, ji ezman ve
dadikeve û rûyê erdê, bi rewnaqiya
wî ve ronahî bû. 2 Û wî bi dengekî
hêzdar bang kir û got: Xera bû,
Babîla mezin xera bû û bû warê
cinan û zîndana bi her tewrî ruhên
xerab û bû sitargeha bi her tewrî
civîkên mindar û erjeng in. 3 Ji
ber ku hemû neteweyan, ji xemra
wê ya zînaya[3] har vexwarin û
qiralên dinê bi wê re zinê kirin û
bazirganên dinê ji hêza sefaheta
wê ve dewlemend bûn.
4 Û min dengekî din ji ezmanan ve
bihîst û got: Ya gelê min, bona ku
hûn nebin şirîkê gunehên wê û rastî
belayên ku tên ser wê nên, ji wir
derkevin! 5 Ji ber ku gunehên wê
gîhaştin ezman û Xwedê neheqi-
yên[4] wê di bîra xwe de anî. 6 Wê
bi xwe çawa daye we, ûsa bidin wê
û li gor karên wê bi du qatî ve bi-
dinê! Û du qatê kaseya ku wê ji we
re tijî kiriye, jê re tijî bikin! 7 Qasî
ku xwe bilind dikir û di sefahetê de
dijiya, êş û keseran bidin wê!
Ji ber ku di dilê xwe de dibêje: Ez
bi qiralîçetî rûdinim û ez ne bî me
û ez ê tu carî şînê negirim! 8 Bo
vê sedemê, dê asîwên wê, mirin û
şîn û xela, di nava rojekê de bên û
dê ew ê bi agir ve bête şewitandin;
ji ber ku Xudan, Xwedayê ku wê
daraz dike biqudret e.
9 Û qiralên dinê yên ku bi wê re
zinê û sefahetê kirine, dema duhê

---

1 Negirtine nin.
2 An jî: Ji min re dibêje.
3 Fuhûş, bêexlaqiya cinsî.
4 Sûcên wê.

şewitandina wê bibînin, dê bona
wê bigirîn û li xwe bixînin 10 û bi
tirsa êşa ku ew dikişîne, dê li dûr
ve bisekinin û bibêjin:
Wey, wey, bajarê mezin, bajarê
xurt Babîl! Ji ber ku di nava sae-
tekê de dawiya te hat! 11 Û bazir-
ganên dinê dê bona wê bigirîn û
şînê bigirin; ji ber ku êdî tu kesê
ku malên wan bistînin nîn in.
12 Êdî tu kesê ku, zêran û zîvan
û kevirên biqîmet û înciyan û
ketena zirav û erxewanî û îpek û
qumaşên mor û sor û bi her tewrî
darên bi bêhn û bi her tewrî fira-
qên ji diranê fîlan û bi her tewrî
malên ji darên bi herî buha û bi
her tewrî malên ji tunc û hesin û
mermer û 13 darçîn û biharat[1] û
buxur û rûnê bêhnxweş û tutsî û
xemr û zeyt û ardên hûr û genimê
wê û gayan û pezan û hespan û
erebeyan û beden û canê mirovan
bikire nîne.
14 Û mêwên ku canê te wan di-
xwest, ji destê te çûn û hemû malên
te yî bi qîmet û çavê mirovan digi-
re ji te tune bûn û tuyê êdî carekî
din vana nebînî. 15 Bazirganên
van malana difirotin û yê ji wê
dewlemend bûbûn, dê bi tirsa êşên
ku ew dikişîne li dûr ve bisekinin
û bigirîn û şînê bigirin. 16 Dê bi-
bêjin: Wey, wey! Bajarê mezin, yê
ku bi ketenê zirav û bi erxewanî û
sor û mor ve hatiye pêçandin û yê
bi zêran û bi kevirên bi qîmet û bi
înciyan ve hatiye xemilandin!
17 Ji ber ku ev dewlemendiya
ewqasî mezin, di nava saetekî de
tune bû!
Û serokê her keştiyê û rêwiyên wê
û karkerên wê û hemû kesên jiyana
xwe bi şuxla behrê ve didomînin
18 û dema duhê agirê ku wê
dişewitîne dîtin, li dûr ve sekinîn
û bi gotina: Mînakekî dinî bajarê
mezin gelo heye? qêriyan. 19 Û
wan axê bi ser serê xwe ve rijan-
din û bi girî û şîn girtinê ve qêriyan
û gotin: Wey, wey, bajarê mezin!
Hemû kesên di behrê de keştiyên
wan hebûn, bi malên wê yî bi qî-
met ve dewlemend bûbûn! Ji ber
ku, ew di saetekê de wêran bû[2]!
20 Ya ezman û pîroz û şagirt û
peyxamberan, li ser wê kêfxweş
bibin; ji ber ku Xwedê wê daraz
kir û mafê we ji wê stend!
21 Û milyaketekî bihêz, kevirekî
mezin yê wekî kevirê aşê be, rakir
û bi gotina:
Bajarê mezin, Babîl, dê bi avêti-
nekî ûsa bête avêtin û êdî tu carî
neyê dîtin! wê avêt behrê.
22 Û êdî dê di te de dengê kesên li
çenkan dixin û murxan dixwînin
û li bilûr û borîjenê ve dixinin, tu
carî neyê bihîstin û êdî dê di te
de tu hunermendê hunerekî neyê

1 Kajûle.

2 Perîşan bû.

dîtin û êdî dê di te de tu carî dengê
aşê neyê bihîstin. 23 Û êdî di te de
şewqa tu çirayî dê nebiriqe û êdî
di te de tu carî dengê bûk û zava
dê neyê bihîstin! Ji ber ku bazir-
ganên te mezinên dinê bûn; ji ber
ku hemû netewe, bi sêrbaziya te,
ji rê ve derketibûn. 24 Û xwîna
peyxamberan û pîrozan û hemû
kesên ku li ser rûyê erdê hatine
serjêkirin di wê de hate dîtin.

*Halelûya daweta Berxikê hat*

19 Û paşî vêya wekî ji ezmên
ve dengekî bilind, yê ci-
vakekî mezin bihîstim û digotin:
Halelûya[1]! Xelaskarî û bilindahî
û hêz mexsûsî Xwedayê me ye!
2 Ji ber ku daraziyên wî rast in û
rasteqîn in; ji ber ku wî, fahîşeya
mezin, ya ku rûyê erdê bi zinêya
xwe ve xera kir, daraz kir û tola
xwîna qûlên xwe ji wê ve stend! 3
Û wan dîsa gotin: Halelûya! Û dû-
mana wê dê heta bêdawiyan were.
4 Û bîst û çar kalepîr û çar afirên
zindî xwe avêtin erdê û ji Xwe-
dayê li ser text ve rûniştiye re pe-
ristîn û gotin: Amîn! Halelûya!
5 Û ji text ve dengek derket, got:
Ya hemû qûlên wî û hemûyên ku
ji wî ditirsin, yê biçûk û yê me-
zin, ji Xwedayê me re şikir bikin!
6 Û wekî dengê civakekî mezin,
dengekî mîna dengên pirr avan û
mîna gurminiya ezman, ya bihêz
be, bihîstim û digotin: Halelûya!
Ji ber ku Xudan, Xwedayê me,
şiyandarê her tiştî, serweriyê
dajo! 7 Em kêfxweş û bicoş bibin
û wî bilind bikin! Ji ber ku daweta
Berxikê hat û Jina wî xwe amade
kir. 8 Û ji bo ku li xwe ke kin-
cên pak û dibiriqe, ji ketenê zirav
e dan wê; ji ber ku ketena zirav,
karên pîrozan yên bi dad in.
9 Û wî ji min re got: Binivîse: Yên
bona ziyafeta daweta Berxikê ve
hatine bang kirin, çiqas dilxweş
in! Û ji min re got: Vana gotinên
rasteqîn yên Xwedê ne! 10 Û
bona ku jê re secde bikim, xwe
avêtim lingên wî. Û wî ji min re
got: Qet meke! Ez rêhevalê derî,
yê te û yê birayên te yî şahdeyiya
Îsa di wan de heye me; ji Xwedê
re secde bike! Ji ber ku şahdeyiya
Îsa, ruhê peyxambertiyê ye.

*Siwarên Hespên sipî*

Met 24,30-31; 2.Sel 1,7-10;
Îşa 66,15-17; Zek 14,3-5

11 Û ezman vebûyî dîtim û a
vay, hespekî sipî li wir sekiniye
û ji yê ku li ser wê siwar bûye
re: Dilsoz û Rasteqîn tête gotin
û bi dadî daraziyê dide û cengê
dike. 12 Û çavên wî mîna agirekî
pêt û pêt dişewite ye û di serê wî
de, bi gellek hejmaran tac hene
û li ser wî, navekî xeynî wî kes
nizane hatiye nivîsandin heye.

[1] Pesnê Xudan vedin.

13 Û qeftanekî di xwînê de ha-
tiye dakirin li xwe kiriye û ew bi
navê: Gotina Xwedê tê bîr anîn.
14 Û artêşên li ezman yên ketenê
zirav yên paqij û sipî li xwe kiri-
ne, li hespên sipî siwar bûbûn û
li pey wî dihatin. 15 Û bona ku li
netewan bixe, şûrekî tûj ji devê
wî ve derdikeve û ew bi xwe,
dê wan bi darekî hesinî bajo û
cenderaya xemra xezeba bi agir
ya Xwedayê ku hêza wî têra her
tiştî dike, ew dê bi xwe bişidîne[1].
16 Û li ser qeftan û qorikên
wî, navê wî yî bi: QIRALÊ
QIRALAN Û XUDANÊ XU-
DANAN hatiye nivîsandin
hebû.
17 Û min milyaketekî di rojê de
disekine dît û bi dengekî bilind
bang kir û ji hemû civîkên li nava
ezman difirin re got: 18 Bona
xwarina goştên hemû qiralan
û goştên fermandaran û goştên
egîdan û goştên hespan û yên li
ser wan siwar dibin û azad û dîl
û mezin û biçûk û hemûyan, bi-
civin û werin ziyafeta Xwedê, ya
mezin!
19 Û min dît ku, cenawir û qi-
ralên dinê û artêşên wan, bona
bi yê ku li ser hespê siwar bûye
û bi artêşa wî re cengê bikin, li
cem hev civiyane. 20 Û cenawir
û peyxamberê sexte, yê ku li ber
wî mûcîzetan dikir û bi mûcîzetan
ve yên mohra cenawir radihiştin
û bi sûretê wî ve diperistin ji rê
derxistibû, hatin girtin; ev her du
bi saxî bi gola agir, ya bi kewkur-
dê ve dişewite hatin avêtin. 21 Û
yê li paşê mayîne, bi şûrê ji devê
yên li hespê siwar bûye derdikeve
ve hatin kuştin û hemû civîk, ji
goştên vana ve têr bûn.

*Hezar sal*

Dan 7,22-27; Pey 5,9-10;
Îşa 2,2-4; 11,6-10; 65,16-25

20 Û min dît ku milyaketek
di destê wî de kilîda[2] ku-
ritiyên bêbinî[3] û zincîrek mezin
heye, ji ezman ve dadikeve. 2 Û
wî ejderha, ew marê kevn ku bi
navê Îblîs û Şêytan tê binav kirin,
girt û bona hezar salî ew girê da.
3 Û bona heta hezar sal temam
bibe, êdî neteweyan ji rê ve der-
nexe, wî avêt kuritiyên bêbinî[4], li
wir girt û li ser wî bi mohr kir. Û
piştî vêya, dê lazim e ku bona de-
mekî kurt serbest bê berdan.
4 Û min textan dît û ew li ser
wan rûniştin û rayedariya daraz
kirinê ji wan re hate dayîn û min
canê kesên di oxra şahdeyiya Îsa
û gotina Xwedê de serê wan ha-
tine jêkirin, yên ku bi cenawir û

1 An jî: Biguvişîne.
2 An jî: Mifte.
3 Dojeh, an jî: Cehenem.
4 Dojehê.

senemê wî ve peristinê nekirine
û li ser enî û destê xwe mohra
wî nestendine dîtin û ew vejiyan
û bi Mesîh re hezar salî serwe-
riyê ajotin. 5 Miriyên din, heta
ku hezar sal temam nebe, rane-
bûn. Vejîna yekemîn ev e. 6 Yên
tevî vejîna yekem bûne, pîroz û
dilxweş in! Tu rayedariya miri-
na duwemîn li ser vana nîne; lê
belê dê ew bibin kahînên Xwedê
û Mesîh û bi wî re hezar sal ser-
weriyê bajon.

*Cezakirina Îblîs*

7 Û dema hezar sal temam bibe,
dê Îblîs ji zîndana ku hatiye avêtin
bê berdan 8 û bona neteweyên
çar hawirdorê rûyê erdê, Gog û
Magog[1] ji rê ve derxe û wan bona
şer li cem hev bicivîne, dê der-
keve; hejmara wan mîna qûma
behrê ye.
9 Û derketin ser firehiya rûyê erdê[2]
û dorûbera artêşgeha pîrozan û
bajarê xoşewîst girtin û agir ji ez-
mên ve, ji Xwedê ve daket û wan
xwarin[3]. 10 Û Îblîsê ku wan ji rê
derxistiye, bi gola agir û kewkur-
dê ve hate avêtin, ya ku cenawir
û peyxamberê sexte tê de ne û roj
û şev, dê bi abadîna abadînan ve
lêdan li wan bê kirin.

*Darazkirina miriyan*

2.Pêt 3,7-12; Yû 5,26-29; K.Şa 17,30-31;
Met 13,38-43

11 Textek mezin yê sipî û yê ku
li ser wê rûniştiye dîtim; ji ber wî
erd û ezman reviyan û ji bo wan
cîhek nehat dîtin. 12 Û min mi-
riyan, yê mezin û yê biçûk, li ber
text sekinîne dîtin û kitêb[4] vebûn
û kitêbek din, ya ku kitêba jiyanê
ye vebû û bi tiştên di kitêban de
nivîsandîne, ji miriyan re, li gor
karên wan hate darazî kirin. 13 Û
behr, miriyên di xwe de ne, dan û
mirin û warê miriyan miriyên di
xwe de ne, dan û her yek, li gor
karên xwe hatin daraz kirin. 14 Û
mirin û warê miriyan bi gola agir
ve hatin avêtin. Gola agir, mirina
duwemîn ev e. 15 Û her kesê ku
di kitêba jiyanê de nivîsandî ne-
hate dîtin, hate avêtinî gola agir.

*Orşelîma nû*

Îbr 11,10.16

21 Û min ezmanek nû û er-
dekî nû dît; ji ber ku ez-
manê pêşîn[5] û erdê pêşîn derbas
bûn û êdî behr nîne. 2 Û min[6]
dît ku bajarê pîroz, Orşelîma nû,
mîna bûka ku xwe ji bo zavê ama-
de kiriye û xemilandiye ji ezman,
ji cem Xwedê ve daket. 3 Û min

---

1 Yecuc û Mecuc.
2 Li ser firehiya welêt, an jî: Li ser welatê Îsraêlê.
3 Şewitand.
4 Pirtûk.
5 Yekemîn.
6 Yûhena.

ji textê[1] ve dengekî geş bihîst: A
vay, konê[2] Xwedê bi mirovan re
ye! Û ew dê bi xwe di nava wan
de rûne û ew dê bibin gelên wî û
dê Xwedê bi xwe bi wan re be,
Xwedayê wan. 4 Û dê Xwedê
hemû hêsiran ji çavên wan ve
paqij bike û êdî dê mirin tune be û
êdî dê ne şîn hebin û ne girî û ne jî
êş hebin; ji ber ku sazûmana berê
ji navendê ve rabûye, digot.
5 Û yê li ser text rûniştibû got: A
vay, ez her tiştî nû dikim! Û wî ji
min re got: Binivîse! Ji ber ku ev
gotin ewledar û rast in! 6 Û ji min
re got: Bû! Alfa û Omega, destpêk
û dawî ez im. Ez ê ji ava kaniya
jiyanê ve bê berdêl bidim kesên ku
tî bûne! 7 Yê serdest bê, dê vana bi
mêrasî bigire û ez ê ji wî re bibim
Xwedê û ew ê ji min re bibe law.
8 Lê belê, gava em bên kesên tir-
sok û bêbawerî û mekrûh û mêrkuj
û zînekar û yên sêrbaz û senem-
perest û hemû derewçînan, cîhê
wan gola agir ya bi kewkurdê ve
dişewite ye; mirina duwemîn ev e.
9 Û ji heft milyaketên ku bi wan
re heft tasên bi heft asîwên dawîn
ve tijî ne hene, yek hat, bi min
re axifî û got: Were, ez Bûka ku
dê ji Berxikê re bibe Jin nîşanî te
bidim! 10 Û min di Ruh de, bir
çiyayekî mezin û bilind û bajarê
mezin, Orşelîma pîroz, ya ji ez-
man, ji Xwedê ve dadikeve, nîşanî
min da 11 û di wê de rewnaqiya
Xwedê hebû; nûra wê, mîna ke-
virekî zehf bi qîmet, mîna kevirê
hêşînorkê ya wekî billûrê dibiriqe
bû. 12 Dîwarê wê yî mezin û bi-
lind û donzdeh deriyên wê hebûn
û di deriyan de donzdeh milyaket
hebûn û navên ku li ser deriyan
nivîsandîne hebûn; vana navên
donzdeh eşîrên[3] lawên Îsraêlê ne.
13 Li rojhilatê sê derî û li bakurê
sê derî û li başûrê sê derî û li roja-
vayê sê derî hebûn. 14 Û donzdeh
kevirên bingehê dîwarên bajêr û li
ser wan, donzdeh navên şagirtên
Berxikê hebûn.
15 Û di destê yê ku bi min re
diaxifî de, bona pîvana bajêr û
deriyên wê, qamîşekî pîvanê ya
zêrînî hebû. 16 Û bajar çargoşe
ye û dirêjiya wê qasî firehiya wê
ye. Û wî bajêr bi pîvanê ve pîva
û qasî donzdeh hezar tîr avêtinê
bû; dirêjiya wê; firehiya wê û bi-
lindahiya wê wek hev in. 17 Û wî
dîwarên wê pîva; li gor pîvana
mirovan, yanê, li gor pîvana mil-
yaket, sed û çel û çar arşinî[4] bû.
18 Û dîwarê wê ji hêşînorkê ve
hatibûn çêkirin û bajar di zelaliya
camê de, ji safî zêran ve hatibû çê-
kirin. 19 Kevirê bingehên dîwarê

1 Ji ezman.
2 Çadir.
3 Ezbetên.
4 Hema hema heftê û pênc mîtro tê.

bajêr, bi her tewrî kevirê biqîmet
ve hatibû xemilandin; kevirê bin-
gehê ya yekemîn hêşînork, ya
duwemîn yaqûta şîn, ya sêwemîn
eqîqa belek, ya çaremîn zimrûd,
20 ya pêncemîn eqîqa sipî, ya
şeşemîn eqîqa sor, ya heftemîn
yaqûta zerînî, ya heyştemîn berîl[1],
ya nehemîn yaqûta zer[2], ya de-
hemîn zumrida zerikî, ya yanzde-
han yaqûta ezmanî û ya donzde-
han yaqûta mor bû. 21 Û donzdeh
derî, donzdeh încî[3] bûn; her yekî
deriyan ji încîyekî hatibûn çêkirin
û rêya bajêr ya mezin di zebloqi-
ya camê de, safî ji zêran ve hatibû
ava kirin.
22 Û min di wê de Perestgeh nedît;
ji ber ku Xudan, Xwedayê şiyan-
darê her tiştî û Berxik, Perestgeha
wê ne. 23 Û bona ronahiya bajêr
hewceyî rojê, an jî heyvê nîne;
ji ber ku rewnaqiya Xwedê wê
ronî dike û Berxik çiraya wê ye.
24 Û dê netewe di ronahiya wê de
bimeşin û bilindahiya qiralên di-
nê[4] dê bînin nav wê. 25 Û deri-
yên wê dê hemûya rojê qet neyên
girtin; ji ber ku dê li wir şev nebe.
26 Û dê rûmet û dewlemendiya
netewan, bînin nav wê. 27 Û ne
yên rêze[5], an jî kesê pîsitiyê dike
û derewan dibêje, lê tenê kesên
ku navên wan di kitêba Berxikê,
ya jiyanê de hatine nivîsandin dê
têkevin wir.

*Çemê avâ jiyanê*

Hêz 47,1-12; 1.Mûs 2,8-10

22 Û wî, çemê ava jiyanê ya ji
texta Xwedê û Berxikê ve
derdikeve û mîna billûrê zelal e,
nîşanî min da. 2 Û li her du aliyan
di navbera rêya wê û çem de darê
jiyanê ya her meh donzdeh tewr
mêwan dide hebû û pelên darê bona
şîfaya neteweyan in. 3 Û êdî dê tu
naletek nebe û texta Xwedê û Ber-
xikê dê di nava wê de be û dê qûlên
wî ji wî re xizmetê bikin 4 û ew dê
wecê wî bibînin û navê wî li ser eni-
ya wan be. 5 Û êdî dê şew çênebe û
dê ne ji ronahiya çirayê û ne ji rona-
hiya rojê ve hewcetiya wan namî-
ne; ji ber ku Xudan, Xwedê ji wan
re bibe ronahî û ew dê bi abadîna
abadînan ve serweriyê bajon.

*Îsa Mesîh tê*

Pey 1,13; 1,7-8

6 Û wî ji min re got: Ev gotinan
ewledar û rast in û Xudanê, Xwe-
dayê ruhên peyxamberan e, bona
ku bûyerên di dema kurt de hew-
ceye bibin nîşanî qûlên xwe bide,
milyaketê xwe şand.
7 Û a vay, ez zû têm! Xwezî li yê
ku bi gotinên peyxamberî yên vê
kitêba digire re be!

---

1 Zimrûda şîn, an jî: Zimrûda ezmanî.
2 Topaz, zebercet.
3 Durr.
4 Serweta xwe.
5 Adî.

8 Û yê ku van tiştana bihîstine
û dîtine ez, Yûhena me. Û dema
van tiştan bihîstim û dîtim, bona
ku li ber lingên milyaketê ku
van tiştan nîşanî min dane secde
bikim, xwe avêtim xwarê. 9 Û
wî ji min re got: Tu carî meke! Ji
ber ku ez rêhevalê te û birayê te
peyxamberan û yên ku bi gotinên
vê kitêba digirin im; ji Xwedê re
secde bike!
10 Û wî ji min re got: Gotinên
peyxamberî yê vê kitêbê bi mohr
meke; ji ber ku dem nêzîk e!
11 Yê ku xerabiyê dike, bila dîsa
xerabiyê bike û yê ku mindar e,
bila xwe dîsa mindar bike û yê ku
rast[1] e, bila dîsa rastiyê bike û yê
ku pîroz e, bila dîsa pîroz bibe!
12 A vay, ez zû têm û ji her kesî
re, li gora mîna ku karên wan e,
xelata min di destê min de ye.
13 Alfa û Omega, yê yekemîn û
dawîn, yê destpêk û dawî ez im.
14 Xwezî ji kesên qeftanên xwe
dişon[2] û bi vî awayî heqê ji dara
jiyanê xwarinê ve qezenc dikin û
ji deriyan ve derbas dibin û dike-
vin bajarê re! 15 Kûçik[3] û sêrbaz
û zînekar[4] û mêrkuj[5] û pûtperest û
her kesên ku ji derewan hez dikin
û dikin, li derve ne.
16 Ez Îsa; bona Dêran[6], bona ku
ji we re ji van tiştan re şahdeyiyê
bike, milyaketê xwe şandim. Ez
reh[7] û nîjada Dawid û sitêrka si-
behê ya dibiriqe me.
17 Û Ruh û Bûk dibêjin: Were!
Û bila yê bibihîze, bêje: Were! Û
bila yê tî bûye were û yê bixwa-
ze, bila ji ava jiyanê ve bê berdêl
bistîne!

*Şahdeyiya di derheqê Kitêbê de*

18 Ez şahdeyiyê ji her kesê ku go-
tinên peyxambertiyê yên vê kitêbê
bihîstine re dikim: Ger kesek
tiştekî tevî vana bike, dê Xwedê
asîwên[8] di vê kitêbê de nivîsan-
dîne, tevî wî bike 19 û ger kesek
tiştekî ji gotinên vê kitêba pey-
xambertiyê ve derxîne, dê Xwedê
ji dara jiyanê û ji bajarê pîroz yên
ku di vê kitêbê de nivîsandîne ve,
para wî derxîne.
20 Yê ku ji van tiştan re şahdeyiyê
dike, dibêje: Belê, ez zû têm!
Amîn! Were, ya Xudan Îsa!
21 Bila xêra[9] Xudan Îsa Mesîh, bi
hemû pîrozan re be! Amîn.

---

1 Salih.
2 An jî: Emirên wî dikin.
3 Yên adî.
4 Yên ku bêexlaqiya cinsî dikin.
5 Qesas, qetîl.
6 Civaka bawerkiran.
7 Rehik, kok.
8 Belayên.
9 Qencî, kerem, an jî: Lutif.

# RASTEKA MENAN

## RASTEKA WEZIN Û PÎVANÊN KU DI PEYMANA KEVIN DE DERBAS DIBIN

Divê mirov bide ber çavan ku pîvan û qîmeta pereyên ku li jêr hatine dayîn li gor dem û rewşê duguherin.

*Pîvanên Dirêjiyê*

| Bi Kurdî | Ayetên ku tê de derbas dibe | Bi Îbranîtî | Mena wê |
|---|---|---|---|
| Çar Tilîk | Der. 25:25; 37:12; 1.Qir. 7:26; 2. Dîr.4:5 | Tefah/ Tofah | 8 Cm. |
| Firehiya Dest | Hêz. 40:5; 43:15 | Tofah | 8 Cm. |
| Bihost | Der. 28:16; 39:9; 1.Sam. 17:4; Îşa. 40:12; Hêz. 43:13 | Zeret | 22,5 Cm. |
| Gez | Afir. 6:15 hwd. | Amma | 45 Cm. |

Nîşe: Dirêjiya geza ku di Hêzekîêl birrên 40-48'de derbas dibin; wekî firehiya dest tevî gezekê be tête dîtin (nêzîkî 53 Cm.)

# RASTEKA WEZIN Û PÎVANÊN KU DI PEYMANA NÛ DE DERBAS DIBIN

Divê mirov bide ber çavan ku pîvan û qîmeta pereyên ku li jêr hatine dayîn li gor dem û rewşê duguherin.

*Pîvanên Dirêjiyê*

| **Bi Kurdî** | **Ayetên ku tê de derbas dibe** | **Bi Grêkî** | **Mena wê** |
|---|---|---|---|
| Gez | Yû. 21:8; Peyxam. 21:17 | Pîhîs | 53 cm |
| Qulac | K.Şag 27:28 | Orgîa | 1,8 m |
| (Dûrbûna) Tîr avêtinê | Lûq: 24:13; Yû. 11:18; Peyxam 14:20; 21:16 | Stadîon | 185 m |
| Hezar Gav | Met. 5:41 | Mîlîon | 1480 m |

*Pîvanên Zad*

| **Bi Kurdî** | **Ayetên ku tê de derbas dibe** | **Bi Grêkî** | **Mena wê** |
|---|---|---|---|
| Pîvek (olçek) | Peyxam. 6:6 | Hînîks | 1,1 lt |
| Pîveka Zad | Met. 5:15; Mar. 4:21; Lûq. 11:33 | Modîos | 8,8 lt |
| Pîvek | Met. 13:33; Lûq. 13:21 | Saton | 12,3 lt |
| Pîvek | Lûq. 16. 7 | Koros | 525 lt |

*Pîvanên Rohnê*

| **Bi Kurdî** | **Ayetên ku tê de derbas dibe** | **Bi Grêkî** | **Mena wê** |
|---|---|---|---|
| Pîvek | Lûq. 16:6 | Batos | 40 lt |
| Çel Lîtir | Yû. 2:6 | Metrîtîs | 40 lt |

*Wezinan*

| **Bi Kurdî** | **Ayetên ku tê de derbas dibe** | **Bi Grêkî** | **Mena wê** |
|---|---|---|---|
| (Nîv, sîh) Lîtir | Yû. 12:3; 19:39 | Lîtra | 330 gr |
| Çel Kîlo | Peyxam. 16:21 | Talanton | 40 kg |

*Menayên Pere*

| **Bi Kurdî** | **Ayetên ku tê de derbas dibe** | **Bi Grêkî** |
|---|---|---|
| Perê Sifir; Quriş | Mar. 12:42;<br>Lûq. 12:59; 21:2 | Lepton |
| (Çend) Quriş | Met. 5:26; Mar. 12:42 | Kodrantîs |
| Deh pere (Metelik) | Met. 10:29; Lûq. 12:6 | Assariyon |
| Dînar | Met. 18:28 hwd. | Dînariyon |
| Pere (ê Zîv) | Lûq. 15:8,9 | Drahmî |
| Du Direm | Met. 17:24 | Dîdrahmon |
| Dravekî Çar Diremî/Zîv | Met. 17:27; 26:15 | Statîr/Argîrîon |
| Mîna | Lûq. 19:13-25 | Mna |
| Talant | Met. 18:24; 25:15-18 | Talanton |

| | | |
|---|---|---|
| 2 lepton | = | 1 kodrantîs |
| 4 kodrantîs | = | 1 assarîon |
| 16 assarîon | = | 1 dînar (direm) |
| 4 dînar (direm) | = | 1 statîr |
| 100 dînar | = | 1 mîna |
| 6000 dînar | = | 1 talant |

Nîşe: 1 dînar, di dema Xudan Mesîh Îsa de mîşeya rojane ya karkerekî bêwesif bû.

# FERHENGOK

## A

*Abba* - Di zimanê Aramiyan de tê mahna: "Bavo."
*Alfa* - Tîpa yekem ya alfabeya (elîfbêya) Grêka ne. Mîna nîşana destpêkê jî tê dîtin û bikaranîn.
*Alîkar* - Di Peymana Nû de di beşa Yûhena de bersiva gotina: "Paraklîtos" ya Grêkî. Paraklîtos ji navên Ruhê Pîroz navek e, wekî din mirov dikare bi gotina: "Xemrevînkir" an jî: "Şîretkir" wergerîne.
*Alimên Olê* - Di Peymana Nû de di mahna zilamên olê yên Cihûdî, ên ku Nivîsên Pîroz kopî dikin, şirove dikin û didin fêrkirinê de yî.
*Alîstin* - Alastin, alîsin.
*Amîn* - Di zimanê Îbraniyan de tê mahna: "Bila ûsa be." Di dawiya duayan de tê gotin. Di Încîlê de, beşa "Peyxam Girtinê" de bona Îsa Mesîh, di mahna: "Dilsoz, ewledar", mîna navekî tê bikaranîn.
*Aramîtî* - Di demên kevnare de zimanê ku netewa Samî ên ku li Sûrî rûdiniştin diaxifîn e. Wekî Suryanîtiyê ye. Zimanê fermî yê qiraletiya Persê bû. Di Peymana Kevin de ayetên Esr. 4:8-6:18; 7:12-26; Dan. 2:4-7:28 û Yêr. 10:11 bi Aramîtî hatin nivîsandin. Di dema Îsa Mesîh de Cihûdiyan li dêvila Îbranitiyê, bi pirranî bi Aramîtî diaxifîn.
*Artemîs* - Xwedayek mê ya Grêkan, gellek girîng bû. Perestgeha herî mezin ya Artemîs, an jî bi navê wê yî latînî ya Dîana, li bajarê Efesosê bû.
*Aşitî* - Aştî, haştî, sulh, silametî.
*Aşera* - Îlaha (xwedêya) dayik ya Kenaniyan. Aşera bi sitûnên dar yên qewartî ên ku li hin deran hatine çikandin dihat nimînandin.
*Aştoret* - Bi gotina Astarte jî tête zanîn. Xwedêya Kenaniyan ya zayînê, evîn û şerê.
*Azad* - Serbest, ne dîl.

## B

*Baal* - Senemekî Kenaniyên kevn perestinê ji wê re dikirin.
*Baalzevûl* - Binêre Baalzevuv.
*Baal-Zebûb* - Tête mahna: "Efendiyê Mêşan." Îsraêliyan bi qerfikî vî navî li îlahê Fîlistan, Baal-Zebûb (xwedayê cihê bilind) kiribûn

(Binêrin. 2.Qir. 1:1-6) Di Peymana Nû de Baalzebûl di mahna Îblîs de tête gotin.

*Bajarê Pîroz* - Orşelîm, Qudûs.

*Barbar* - Grêkan vî navî dida neteweyên xeynî xwe, ev nava pêşiyê nedihat mahna biçûk dîtinê.

*Bav* - (Dema bi tîpên mezin ve bê nivîsandin) di mahna Xwedê de hatiye bi kar anîn. Vêya ne bi cismanî ye. Ev ruhanî ye û mîna sembolekî (nîşanekî) tê gotin. Çawa ku bê bav zarok çênabin, bêyî Xwedê jî tu tişt çênebûye. Her tişt ji Xwedê ye û wî her tiştî afirandiye. Xwedê çavkaniya her tiştî ye (Destpêkirin 1, K.Şag. 17:28-29, Îbraniyan 2:10). Lê belê Xwedê mirovan di şiklê xwe, di mînakiya xwe de afirand. Ji ber vê yekê ew bi mahna ruhanî Bavê mirovan e.

*Behra Gewez* - Bi Îbranîtî ev nav bona du cihê cuda tête gotin:

1-) Behra ku dema Îsraêlî ji Misirê derketine tê de derbas bûne. Wusa têtê fêhm kirin ku ev bûyer nêzîkî dawiya Kendava Suweyşê, di herêma avzêl de derbas bûye. Ev der bi navê: “Golên Tahl” jî tête zanîn.

2-) Kendawên Suweyş û Akabeyê.

*Beelzebûb* - Binêre Baalzevuv.

*Bêsunet* - Di Kitêba Pîroz de yên ku ne ji Netewa Îsraêlê ne.

*Bi cin* - Girtiyê (dîlê) cinê, cinoyî.

*Birek Leşker* - Bi Yewnanî Lêjiyon. Di dema Împaratoriya Romiyan de Lêjiyon hêzek leşker bû. Hejmara wê, kêm û zêde, ‘şeş hezar leşker’ bû.

*Biryar* - Qirar.

*Bisunet* - Netewa Îsraêl.

*Bixûr* - Cewiya darîna ye (wek şîrêzê ye). Ew ji darên ne ji hev tê civandin û hişk kirin. Gava tê şewitandin, bêhneke pirr xweş jê diçe. Bixûr tiştekî biqîmet e. Di Perestgehê de gorîgeha bixûrê hebû; li wê derê ji Xwedê re bixûr dihatin şewitandin.

*Bi zimanan axaftin* - Axaftina kesekî ku di bi çalakiya Ruhê Pîroz de bi zimanekî biaxife. (Binêr. K. Şag. 2:4-13; 10:46; 19:6; 1.Kor. 12:8, 28, 30; 14:2-39)

## C

*Cehenim (Kortalabêbinî)* - (Dojeh) Bi Yewnanî HÊABÛSSOS. Ev der cihê ezabê ye. Xwedê wir, bona Îblîs û cinên wî ava kiriye. Û heçî

mirovên ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh ve naynin, dê Îsa Mesîh di roja daraziyê de wan bavêje wê derê.

*Cejn* - Cejnên ku di Kitêba Pîroz de derbas dibin:

*Cejna Derbasbûnê* - (ya Fisihê) Ev cejn di nav gelê Îsraêlê de di çardeha meha Nîsanê de tê pîroz kirin.

*Cejna Holikçêkirinê* - Cihûd her sal di navbera mehên Îlon û Çiriyê de (ji 15.an heta 21ê meha Tişriyê) diçûn rezên xwe û holikan çêdikirin û hefteyekê di wan de diman. Cihûdan bona ku Mûsa Peyxamber û derketina Cihûdan ji Misirê û çel salî di çadirê de mayîna wan bînin bîrê vêya dikirin.

*Cejna Nanê Bêhavên (Şkeva)* - Ev cejn, li pêy Cejna Derbasbûnê tê û ji 15 heta 20ê Nîsanê didome. Ev cejn li ser xelasiya Îsraêlêyan ji Misirê ve tê pîroz kirin. Di van rojên cejnê de nanê bi havên ve çêbûne nayên xwarin.

*Cejna Pîrozkirina Perestgehê* - Berî bûyîna Îsa, nêzîkî 167 salan Perestgeha Orşelîmê ji aliyê Gelê Sûrî ve hatibû herimandin. Piştî sê salan, Perestgeh û Cihûd ji bin destê Sûriyan azad bûn. Bona vê yekê Cejna Pîrozkirina Perestgehê dihat pîroz kirin. Cejnê ji 25ê Çile ya pêşîn dest pê dikir û 8 roj didomiya.

## RASTEKA DEM Û NAVÊN CEJNAN

| Navê Cejnê | Ayeta ku tê de derbas dibe | Dîroka wê |
|---|---|---|
| Cejna Fisihê | Der. 12:1-14; Lêw. 23:5; Hejm. 9:1-14; 28:16; Ji nû. 16:1-3a,4b-7 | 14 Avîv (Adar – Avrêl) |
| Cejna nanê Bêhavên | Der. 12:15-20; 13:3-10; 23:15; 34:18; Lêw. 23:6-8; Hejm.28:17-25; Ji nû. 16:3b,4a,8 | 15 -21 Avîv (Adar – Avrêl) |
| Cejna Çinînê / Cejna Hefteyan / Cejna Pentîkostê | Der. 23:16a; 34:22a; Lêw. 23:15-21; Hejm. 28:26-31; Ji nû. 16:9-12; K. Şag. 2:1 | 6 Sîvan (Gulan Pûşbêr) |
| Roja bîranînê/ Rojî Li Borî Xistinê / Sala Nû | Lêw. 23:23-25; Hejm. 29:1-6 | 1 Îlon (Cotmeh) |
| Roja Lêborînkirina Gunehan | Lêw. 16:1-34; 23:26-32; Hejm. 29:7-11; K. Şag. 27:9-10 | 10 Îlon (Cotmeh) |
| Cejna Çerdexan / Cejna Zadê Dan Hev | Der. 23:16b; 34:22b; Lêw. 23:33 – 36a; 39:43; Hejm. 29:12-34; Ji nû. 16:13-15; Zek. 14:16-19 | 15 - 21 Îlon (Cotmeh) |
| Cejna Bîranîna Vekirina Perestgehê | Yû. 10:22 | 25 Kîslev (Mijdar – Berfanbar) |
| Cejna Pûrîm | Est. 9:18 – 32 | 14, 14 Adar (Reşemî – Adar) |

## H

*Hêrodês* - Di Încîlê de navê pênc kesan e. Vana di dem demî de jiya ne.
*Hez kirin* - Jê hez kirin, hîj kirin, hez jê kirin.
*Hewre* - Bin. Kenişt.
*Hînkarî* - Doktrîn, qaîdeya an jî armanca bawerkirinê.
*Hînkirin* - Fêrkirin, elimandin, hûbûn.
*Hîtit* - Navê Hîtitê yê ku di Peymana Kevin de derbas dibe du gelên cihê dide nasîn:
1) Berî vegirtina Îsraêliyan, gelê li Kenanê dijiyan (Mînak Serw. 23:10)
2) Zazên Hîtitên Enedolê yên ku li Sûriyê û li Enedola Başûrê Rojhilatê qiraletiyên "Hîtita-Dereng" amade damezirandine (1.Qir. 10:29; 2.Dîr. 1:17).
Têkiliya van gelan ya ku bi hev re ne bitûmî nayên zanîn.
*Hozana* - Di zimanê 'Aramî' de tê mahna 'Niha Xelas Bike'. Ev gotina, di Încîlê de, bona silavdana Xelasker Îsa ve hatiye gotin.

## I

*Ilm* - Zanyarî.

## Î

*Îblîs* - Mîrê cinan.
*Îbranîtî* - Zimanê Îsraêliyan. Di Peymana Nû de li hinek cihên ku qala Îbranîtiyê dikin, li wan deran qesda Aramîtiya ku wekî Îbranîtiye dikin.
*Îsa* - Mahna navê Îsa, bi Îbranî (zimanê Tewratê) 'Ya Xudan, (me) xilas bike', an jî 'azadbûn' e. Îsa di zimanê Îbranî de YÊŞÛAH e.

## J

*Jiyan* - Jîn, heyat.
*Jin* - Pîrek.

## K

*Kahîn* - Heçî kahîn bûn, ew ji nijada Harûn, birayê Mûsa peyxamber ve dihatin. Wan ew goriyên ku qewmê Îsraêlê dianîn, serjêdikirin. Ew di ber qewm de li ber Xwedê disekinîn, dua û xêrê dikirin û daxwaziya Xwedê bi gel ve didan naskirin. Wan deheka (zikata) dexilê û hatina berê erdê Îsraêlê ji xwe re distendin. Di nav mezinên Cihûyan de serekên kahînan jî hebûn. Serkahîn (Serokkahîn) mezinên hemû kahînan bû û berpirsiyariya civîna mezinan dikir. Dema kahîntiyê, heta hatina Îsa Mesîh domiya. Piştî hatina wî kahîntî betal bû.
*Kalepîr* - 1- Di neteweya Îsraêlê ya kevin de serokên malbatên pêş ve tên (Binêrin Sazûmana Bilind). 2- Çavnêrîdaran, kontrolkiran.
*Karmend* - Memûrê dewletê.
*Kenanî* - Kesê ji netewa Kenanî ya di Filistîna Kevin de jiya ne.
*Kenişt* - (Hewre) Cîhê civata ruhanî ya Cihûyan e. Di her bajarên Cihûyan de Hewre hebûn. Ew ji bo xwendina Tewrat, Zebûr û Nivîsên Peyxamberan û ji bo peristina Cihûyan jî bûn. Li wir qurban nedihatin serjêkirin.
*Kîfas* - Bi zimanê Aramiyan ve gotina navê Pêtrûs, tê mahna 'Zinar'ê.
*Kitêbên Pîroz* - (Nivîsarên Pîroz) Di dema Îsa Mesîh de tenê Tewrat, Zebûr û Nivîsên Peyxamberan hebûn. Mizgîniya Xwedê (ÎNCÎL) piştî rabûna Îsa hate nivîsandin.

## L

*Law* - Îsa Mesîh.
*Lawê Mirov* - (Kurê Mirov, Kurê Însan) Çawa ku ji Kitêba Daniyêl Peyxamber (7: 13-14) tê xuyakirin, Îsa Mesîh bi xwe vî navî li xwe kir. Ev xwebinavkirina Îsa, bi rengekî nuxumandî dide xuyakirin ku Îsa ye, ew Mesîhê ku soz pê ve hatiye dan, yê ku Xwedê qiralî li ser seranserê dinê daye destê wî. Ev xwebinavkirina wî, xwe mirovkirin û riya wî di xwe nizimkirin û ezabkişandinê de jî dide xuyakirin.
*Lawê Xwedê* - Ev nav ji Îsa Mesîh re tê gotin. Di Kitêba Pîroz de, Lawê Xwedê qet bi mahna fizîkî (cismanî) nayê fêhm kirin. Lê belê Îsa Mesîh bi mahna ruhanî Lawê Xwedê ye. Lawê Xwedê gotina Xwedê ye û gotina Xwedê bi xwe Xwedê ye. Lawê Xwedê ji Bav, ji Xwedê tê û ji berî afirandina erd û ezmanan Law li ba Bav bû. Bav û Law yek

in, daxwaza wan jî yek e. Serweriya Law mîna ya Bav e û Law, Bav ji mirovan re dide zanîn û eşkerekirin û Law bi her avayî eşkerebûna Bav e. Ji kerema xwe, di bin gotina Bav de bixwînin.(Met. 1:18-20; Yû. 1:1-5; 5:21-23, 10:30, 13:3, 14:9, 16: 27-28, Lûq 10:22)

*Lêwî* - Ji donzdeh lawên Aqûp yek jî Lêwî bû (Navê Îsraêlê jî didin Aqûp). Lêwî bi xwe jî yek ji wan donzdeh bavikên Îsraêlê bû. Mûsa û birayê wî Harûn, her du jî ji vî bavî bûn. Ji nav vî bavikî Xwedê, bona kahîntiyê Harûn û nijada wî bijartin.

*Lîtirek Romî* - 327 gram bû. Lîtira îroyîn 1000 gram e.

## M

*Mamoste* - Dersdar, fêrdar, mialim.

*Manna* - Gava Xwedê gelê Îsraêl ji Misirê derxist anî çolê, ew der cihekî vala, bê şînayî û bê dar bû. Li wir, bona xwarina wan, Xwedê ji ezman ve manna barand û da wan. Manna tiştekî wek xwîsê xuya dibû. Libên wî girover û sipî bûn, wek tovê gijnîjê. Tama wî wek tama nanê şkeva yê hungivkirî bû. (Derketin:16; Hejmaran 11:4-9)

*Mesîh* - Mesîh gotineke Îbranî ye. Mahna wê bi Îbranî ev e: "Yê rûnkirî/ yê don kirî/yê Mesh kirî." Gava yek dibû qiral, ew dihat rûn kirin. Ew jî dibû nîşana ku ew kes bûye qiral. Di Mizgîniyê de, Îsa Qiralê hemûya dinê ye. Rûnkirina wî ji ezmanan e. Xwedê wî bijart û nîşan da.

*Mirmirîn (pitepit kirin)* - Bi dengekî nizim, di ber xwe de axaftin.

*Mirov* - Meriv, însan.

*Mizgînî* - Navê Mizgîniyê (Peymana Nû), ya di nava gel de bi navê 'ÎNCÎL' ê ve tê nasîn, bi rastî EVANGELIYON e û mahna wê NÛÇEYA KÊFXWEŞIYÊ ye.

## O

*Orşelîm* - Jê re Qudsa Şerîf, Yerûşalem, Şalem, Siyon, bajarê Pîroz, bajarê Dawid jî tê gotin. Ew bajarê Cihûyan, yê herî girîng e. Perestgeha Cihûyan li wir bû. Berî 3000 salan qiral Dawid Orşelîm ji destê Yebûsiyan ve derxist.

## P

*Perestgeh* - (Binêr. Hewre) Cihê civata ruhanî ya Cihûyan e. Di her bajarên Cihûyan de Hewre hebûn. Ew ji bo xwendina Tewrat, Zebûr û Nivîsên Peyxamberan û ji bo peristina Cihûyan jî bûn. Li wir qurban nedihatin serjêkirin. Perestgeh çar beş bû: Hewş, Hundur, Pîrozgeh û Cihê Herî Pîroz. Perdeyekî mezin Pîrozgeh û Cihê Herî Pîroz ji hev vediqetand. Salê carekê Serokkahîn diçû Cihê Herî Pîroz. Wî li wir hem di ber gunehên xwe de, hem jî di ber gunehên netewê de qurbanan serjêdikirin. Gava Îsa li ser xaçê ve mir, ew perda pîroz di nîvî re çiriya (Lûq. 23:44-46). Di sala 70 an de -p.z- Serokê leşkerê Împaratoriya Romayê Tîto, Perestgehê ji destê Cihûyan derxist û wêran kir. Ji wê pêv, careke din Perestgeh nehatiye ava kirin.

*Peristin* - Îbadet kirin.

*Peyv* - Gotin, xeber, qise, kelam.

*Peyivîn* - Qise kirin, axaftin.

*Peyman* - (Ehd) Peyman di nava du mirovan de, di nava du dewletan de, an jî di nava Xwedê û mirovan de tê girêdan. Kitêba Pîroz du beş e: **Peymana Kevin û Peymana Nû**. Xwedê bi navdîtiya peymanan ve têkiliyê bi mirovan re daniye. Peyman, ne lihevhatina her du aliyî ye; lê belê rast e rast ji qencî û têkiliya Xwedê ve çê dibin. Ev peymana ku ji hezkirina Xwedê ya ji mirovan e, gerdûnî ye. Mirov ne dikare tiştekî li wê zêde bike, ne jî ji wê kêm bike. Nêzîkayî bi alîyekî ye û ji Xwedê ve ye. Hemû dem û dewranan û bêdawîbûnê jî dexlî xwe dike.

*Peymana Kevin* - Xwedê bi navdîtiya Mûsa, daxuyaniya Peymana Kevin ji Lawên Îsraêlê ve kiriye û bi vê rêyê têkiliyê bi wan re daniye.

*Peymana Nû* - Încîl. Peymana Nû, ne tenê bona Lawên Îsraêlê, bona hemû mirovahiyê ye. Xwedê, soza ku di Peymana Kevin de dabû bapîran, bi Peymana Nû ve temam kiriye. Peymana Nû bi xwîna Îsa Mesîh ve di nava Xwedê û mirovan de hate girêdan.

*Peyxamber* - (Nebî) Ew însan bûn. Xwedê bi wan re axifî ku ew gotinên wî bigihînin mirovan.

*Pêtrûs* - Jê re Şîmûn jî tê gotin. Ew yek, ji donzdeh şagirtên Îsa bû. Ew Resûl bû. Mahna navê Pêtrûs, bi Yewnanî ‘kevir’ e.

*Pîroz* - *1*- Bimbarek 2- (Miqaddes, muqades, bihurtî) Mahna gotina ‘pîroz’ li gora Kitêba Pîroz ruhanî ye. Ew bi mahna, yê ji Xwedê re veqetandî (cuda) ye.

## Q

*Qedeh* - Piyan, tas.
*Qof* - Qilûz.

## R

*Rastîparêz* - Mafhez, dadperwer, alînegir, heqnas.
*Rayedarî* - *1*- Hikumdarî, desthelatî, selahiyet, serdestî 2- Fewet, qudret.
*Reht* - Nerehetî, bêaram.
*Rizgar kirin* - Xelas kirin, azad kirin.
*Roja Septê* - (Şabat, Şemî) Roja ku bona Cihûyan herî taybetî û pîroz. Înyê êvarê, gava roj diçe ava Sept destpêdike û bîst û çar saetan didome. Li gor Tewratê, di roja Septê de kar nayê kirin, ew tenê roja aramî û peristinê ye.
*Roja Vejînê (Roja jinûverabûnê)* - (Roja qiyametê) Roja ku hemû mirov dê ji mirinê ve rabin û li ber Xwedê û Îsa Mesîh bên darazî kirin.
*Ruhê Pîroz* - (Rûhul Qudus) Ruhê Pîroz, bi xwe Ruhê Xwedê ye. Ew li dinê alî mirovan dike. Bi Ruhê wan re diaxife, dilê wan vedike û daxwaziyên Xwedê bi wan dide nas kirin.
*Rûmet* - Îzet, mezinahî, bilindahî.
*Rûn kirin* - (Hetwan kirin, don kirin) Li gora kevneşopa Cihûdan, gava yek dibû qiral, ew dihat rûn kirin. Ev jî dibû nîşana ku ev kes bûye qiral. Êdî yê rûnkiriyê Xwedê ew e ku, Xwedê hilbijart û nîşan kir yanê Mesîh e. (Lûq. 4:18) 2. Gelê hingê jî rûn, wek rûnekî bêhnxweş li serê mêvanên xwe didan (Lûq. 7: 46, Zebûr 23:5) û laşên miriyan jî pê rûn dikirin (Lûq. 23: 56-24:1).

## S

*Samerî* - Di dema qiraliya Rehoboam (lawê Silêman, qiralê Cihûstanê) û Yeroboam (qiralê Îsraêlê) de qewmê Îsraêl ji hev veqetiya. Rehoboam bi sê bavikên Îsraêlê ve li bajarê Orşelîmê û di Cihûstanê de ma. Yeroboam bi neh bavikên Îsraêlê ve Sameriya ji xwe re kir paytext. Bi vî avayî, neteweya Îsraêlê bû du parî û neyartiya hev kirin. Piştî vê yekê jî qiralê Aşûriyan gellek neteweyê Îsraêlê ji hawîrdora Sameryayê sirgûn kirin bajarê Mêdya û nav yên neteweyên din (1 Qiral 16:24) Di cihê neteweya Îsraêlê de qiralê Aşûriyan gellek nete-

weyên biyanî bi pûtên wan ve anî û di welatê Samerya de cihwar kir (2 Qiral 17:24-40) Bi vî avayî gelê Samerya bi neteweyên senemperest ve dan û stendin, esil û baweriya xwe herimandin û xwe ji Tewratê ve dûr xistin. Îcar Samerî ew in ku ji Samerya û hawîrdora wê bûn.

*Serhildêr* - Kesê ku bi armanceke polîtîkî serî radike.

*Serweriya Xwedê, Serweriya Ezmanan* - (Xundikariya Xwedê, Qiraliya Xwedê) Serweriya Xwedê, hukimdariya wî ye. Gava mirov li ber Xwedê rabû (Afirandin. 3), hingê Îblîs ew kir bindestê gunehan (Lûq. 4:5-6, 1. Korînt. 2:8, 15:24-27; 2.Korînt. 4:4 ). Lê belê Xwedê bi jiyan, mirin û rabûna Îsa Mesîh deriyê Serweriya xwe ji mirovan re vekir. Ew mirovên ku bi Mizgîniya Îsa Mesîh bawer dikin, dikevin Serweriya Xwedê (Marq. 10:15; Met. 19:16-17, 23-30, 6:33). Hingê Xwedê dibe Qiralê wan û ew ji bin serweriya Îblîs û gunehan derdikevin (Kol. 1:13). Mahna Serweriya Xwedê û Serweriya Ezmanan yek e. Meta gotina 'Ezmanan' ji dêvla 'Xwedê' ve bîr anî. Ji ber ku wî Mizgîniya xwe zêdetir bi devoka Cihûdan ve nivîsand û ne adeta Cihûdan bû ku navê Xwedê yê pîroz zêde bi kar bînin. Ji ber vê yekê Cihûdan gellek caran 'Ezman' (Cihê ku Xwedê lê ye) ji dêvla navê Xwedê ve bi kar dianîn. Li derên ku Meta 'Serweriya Ezmanan' nivîsî, Marqos û Lûqa 'Serweriyê Xwedê' nivîsandin. (Met. 4: 17 û Marq. 1:15; Met. 5:9 û Lûq. 6:20; Met. 8:11 û Lûq. 13:28)

*Sumbul* - (Nard, mur, zimir) Şînayiyeke Hîndistanî ye ku, rûnê bêhnxweş jê tê derxistin.

## Ş

*Şagirt* - Yên ku fêr dibin. Gellek şagirtên Îsa hebûn. Donzdeh heb jî ji wan hilbijartî bûn. Ew şagirt (şandî) bûn.

*Şandî* - (qasîd, resûl) Bi zimanê Yewnanî APOSTOLOS e. Mahna vê gotina 'yê şandî' ye. Îsa Mesîh ji nav şagirtên xwe donzdeh şandî bijart û wan şandin ku, bo Mizgîniya Xwedê bidine neteweyên dinê.

*Şerîeta Mûsa* - (Zagona Mûsa) Zagona Mûsa, ew zagona ku di Tewratê de ye. Tewrat ji pênc kitêbên Mûsa ava bûyî (Afirandin, Derketin, Lêwiyiyan, Hejmaran û Ji nû ve lêkirin a Zagonê). Zagon, tenbîh, destûr, dîrok, wekok û bûyer di van pênc pirtûkan de ne. Xwedê vê Zagonê li ser Çiyayê Sînayê di nav ewran de bi Mûsa ve da hîn kirin.

## T

*Tabûr* - Artêşa leşkerî. Tabûrek di artêşa Romayiyan de komeke 500-600 leşkeran bû.
*Telant* - 6000 zîv. Ji kerema xwe li rasteka menan binêrin.
*Text* - Cîhê ku qiral lê rûdine. Ew nîşan û sembola quwet û hukumdariyê ye.
*Tîravêtîn* - (qad, meydan) Hingê dûrbûniya her tîravêtinekê bi qasî 185 metran bû.

## V

*Vejîn* - Rabûna ji nava miriyan, jinûverabûn, qiyamet.

## X

*Xelîtik* - Peredanka çermîn e, ya ku li piştê tê girêdan.
*Xudan* - (Reb, Xwedî, Xweyî) Di Kitêba Pîroz de mahna Xudan 'Xwedî' ye. Di Kitêba Pîroz de Xudan navekî Xwedê ye û navek ji navên Îsa Mesîh e.

## Y

*Yewnan* - (Grêk) 1-Neteweyê welatê Yewnanîstan. 2- Di dema Îsa Mesîh de, Cihûdan ji hemû neteweyên din, yên ne Cihûd bûn re bi gelemperî digotin 'Yewnan'.
*Yûhena* - Yek ji donzdeh şagirtên Îsa bû. Ew şandî bû. Wî 'Încîla Yûhena' û sê nameyên ku di Încîlê de ne nivîsand. Wî beşa "PEYXAM GIRTIN" ê jî nivîsandiye.
*Yûhenayê Vaftîzkar (Yehya)* - Peyxamber û gotinbêjê gotina Xwedê bû (Lûq. 1:13-17, 7:26). Tobedaran di avê de vaftîz dikir û netewa Îsraêl ji bona Mesîh amade dikir (Lûq. 3:3-20, 7:27). Yûhena (Yehya) berê gel dida Îsa Mesîh, da ku baweriya xwe bi wî bînin.

## Z

*Zevî* - Erdê çandiniyê.
*Zilam* - Mêr
*Zîv* - Zîvek (DRAXMÊ Û DÎNARION bi Yewnanî) mîna heqê roja palekî bû.

# KA KENGÎ DÊ SERÎ LI KU BÊTE DAYÎN

| | |
|---|---|
| Dema tirsê: | Met 10,28; 2.Tîm 1,7; Îbr 13,5-6 |
| Dema xemgîniyê: | Met 6,19-34; Fîl 4,6; 1.Pêt 5,6-7 |
| Dema rêşaşiyê: | 1. Yû 1,4-9 |
| Dema tûnebûnê: | Met 5,4; 2.Kor 1,3-4 |
| Dema hestên tolhildanê rabe: | 1. Kor 13 |
| Dema binketinê: | Rom 8,31-39 |
| Dema di bin talûka bêtariyê de: | Lûq 8,22-25 |
| Dema di motajî parastina Xwedê de: | Fîl 4,19 |
| Dema windakirina cesaretê: | Met 5,11-12; 2. Kor 4,8-18; Fîl 4, 4- 7 |
| Dema dil bi gumanan ve tijî bibe: | Met 8,26; Îbr 11 |
| Dema rastî tengezariyê bên: | Met 6,25-34; Îbr 4,16 |
| Dema windakirina baweriyê: | Îbr 11 |
| Dema heval biterikînin: | Lûq 17,3-4; Rom 12,14. 17.19.21; 2. Tîm 4,16-18 |
| Dema dûrî malê bimîne: | Met 10,16-20 |
| Dema tenêbûnê: | Îbr 13,5-6 |
| Dema Gunehkirinê: | 1.Yû 1,9; 2,1-2 |
| Dema Xwedê bersiva duê nede: | Aqûb 4,3 |
| Dema barê jiyanê giran be: | Met 11,28-30; Gal 6,9-10 |
| Hezkirina rasteqîn: | 1. Kor 13 û Rom 5,6-8 |
| Dua: | Lûq 11,1-13; Met 6,5-15 |

clv
ISBN 978-3-89397-005-6
9 783893 970056

Hoffnung und Leben e.V.
ISBN 978-3-00-022821-6
9 783000 228216